| **deysgîran** | dezqîran, ahenga dezgirtinê |
| **deys** | dêz, dey, alif |
| **dezge** | mêz, doşk, rêbarî, rûçik |
| **dezgeh** | destgeh, kar, pîşe |
| **dezgîn** | reşme yan rişme, hevsar |
| **dezgîr** | dahatî, feyde, sûd |
| **dezî** | dezû ta yan benikê pembûyî |
| **dê** | da, dadê, dayk, yadê, dayê, hilo rabe dest pê bike |
| **dêbav** | dapîr, pîrik ya bavî |
| **dê û bav** | dayik û bav |
| **dêjayet** | serkeşî, gûnehî |
| **dejink** | helez, keskatiye bo xwarinê, reşad |
| **dêkloz** | texlît xwarin e |
| **dêl** | bedêl, berdêl, şon |
| **dêl** | dêhl, mêya se, kitik û gûr û canewerên şêrdar |
| **dêlegûr** | mê gûr |
| **dêle hirç** | mêya hirçê |
| **dêlemar** | kimkime |
| **dêlepiling** | mêya pilingî |

| | |
|---|---|
| **dêlik** | tîleka mêya seyî |
| **dêle se** | mêya seyî |
| **dêle şêr** | mêya şêrî |
| **dêlî** | mehşêl, dar mêw |
| **dêlindêz** | şahînet, ya filehan çardehê sibatê |
| **dêm** | rû, zeviya xwelî serbaranî girtî bo çandinê |
| **dêmanî** | cotyar, (niştecê ne koçer) |
| **dêmarî** | dêmehr, zirmak, zirdayik |
| **dêmçîn** | çandina dêmî (li ser baranê) |
| **dêmîr** | dayka mirî |
| **dên** | pêxwas pê rût, bê pêlav |
| **dêr** | xêz, rêz, tîx, olgeya rebenan |
| **dêra** | nave yan diyar bû |
| **dêran** | hejar, mendebûr, daneba, karêjî |
| **dêrandî** | danebayî, karêjkirî |
| **dêraye** | helbijartin |
| **dêse** | bizin yan miha çiyayî |
| **dêw** | ehremen hêzdar |
| **dêwbend** | niviştiya di dêwan |
| **dêza** | zirkeç, nevisî |
| **dêz** | cêz, kom, kidîş |
| **di** | de, amêra berdanê bo şêweya komkirinê |
| **dibaze** | renc dike |
| **dibazin** | ked û renc di karî da |
| **dibe** | çêdibe |
| **diber** | bi awayê |
| **diberde** | bi sexbirî |
| **dibistan** | xwendegeyek, zanîngeh |
| **dibî** | dibe, çêdibe |
| **dicih** | di cîda, cîhda, dem û dest |
| **dicle** | rûbarê li bajara diyarbekrê dizêt li kurdistanê |
| **didan** | diran, didan |

| | |
|---|---|
| **didan êş** | jana didanî |
| **didan gîr** | qira mekîneyê |
| **didan kêş** | didan helkêş |
| **didan kêşî** | didan helkêşanî |
| **didan kûrmî** | yan kirmî didan kilorbûn |
| **didan tûj** | didan bir |
| **didansaz** | pizişkê didanan |
| **didansazî** | pizişkiya didanan |
| **didêrîn** | daxwaz |
| **dido** | dû |
| **didona** | li babet, li ser, li mer |
| **didork** | hov |
| **didowa** | duyem |
| **difn** | poz, kep |
| **difinbilind** | pozbilind, fort, port |
| **difin pehn** | poz pelixî, difin maç |
| **difir** | difre, paye, font, basimbêj, fortek |
| **difre** | tifre, fort, port, nexweşiyek hespan fêz |
| **digavê de** | cih da, dem û dest |
| **digel** | li gel, pêra, pêkve |
| **digelhev** | pêkve |
| **digel vî hindî** | digel vî qasî, digel vî yekî, li gel hindê |
| **digme** | dikme, benik yan tayê badayî |
| **digre** | pêve dimîne |
| **dihanamin** | rizgar |
| **di her ciyî da** | li her derî |
| **di her gavê da** | li her demî |
| **dihev daye** | leş qayim |
| **dihevde** | jina tijî, qelew |
| **dihevdeketî** | herifî |
| **dihêvot** | parastin |
| **dihmik** | texlît darên mîweyî |

| | |
|---|---|
| **dihindan** | werzîş |
| **dihindanvan** | rahênerê werzîşî |
| **dihol** | dehol, dahol |
| **diholjen** | daholvan |
| **dij** | diz, kele, mirûsî, ber, neyar |
| **dijan** | mezinbûn |
| **dijber** | berhelist |
| **dijgûn** | hejar |
| **dijgûnî** | hejarî |
| **dijhev** | dijayetî |
| **dijmin** | neyar, mixrik |
| **dijminayî** | neyarî |
| **dijmin** | xeber, galgal, çêr, cinêw |
| **dijûn** | pîs |
| **dijûnbûn** | dijûnê pîsatî, pîsî |
| **dijûnkirin** | pîskirin, cinêwdan |
| **dijûnkirî** | pîskirî, riswakirî |
| **dijwar** | çetîn, sext, hov |
| **dijwarî** | sextî, cetînî, hovî |
| **dijwariya givêrê** | zehmetiya givêrînê |
| **dik** | sekû, hendef, textçik, mitik |
| **dikan** | firoşgeh |
| **dikandar** | xwediyê firoşgehê |
| **dikandin** | gemarkirina kirasî |
| **dikêşe** | xem dike |
| **dikinandî** | kirasê gemarî, pîs |
| **dikil** | pax, tekabo, kenoş, çokdan |
| **diknî** | dijûn, gemarbûna kirasî |
| **dikoşim** | bizav dikim |
| **diktor** | bijişk |
| **dil** | endamê belavkirina xwînê di leşî da |
| **dilamet** | erk, kar |

| | |
|---|---|
| **dilar** | diler, aza mêrxas |
| **dilarî** | dilêrî, azayî, mêrxasî |
| **dilawer** | aza |
| **dilaza** | wijdan serbest |
| **dilazar** | xemdar |
| **dilbawer** | bawermend |
| **dilbaz** | dildar, dilkêş |
| **dilber** | dilkêş |
| **dilberî** | dilkêsî |
| **dilbest** | dilcan |
| **dilbeste** | pest, mirûs, mirîto |
| **dilbêdar** | wûrya, hoşyar |
| **dil bi êş** | şepirze, hejar, belengaz |
| **dilbijandî** | dilcûyî |
| **dilbijok** | bêrîker |
| **dilbijokî** | niyaz, dilçon |
| **dilbikul** | xemdar, kovan |
| **dilbirîn** | dilşikestî |
| **dilbî** | texlît hêjîra baş |
| **dilçûn** | dilbijandin |
| **dilda** | şaş |
| **dildan** | tazeyî dilovanî |
| **dildar** | dilber, evîndar |
| **dildarî** | dilevîn |
| **dilêr** | mêr, êkde, kamêran, mêrxas, aza |
| **dilêrî** | mêrxasî |
| **dilêş** | jana dilî |
| **dilêşandin** | dilêşî, zehmetî, rencdarî |
| **dilfireh** | peşe dirêj, aram |
| **dilfirehî** | peşe dirêjî |
| **dilgerm** | perûş, xwîn germ |
| **dilgeş** | şad, keyfxweş |

| | |
|---|---|
| **dilgeşî** | keyfxweşî, dilxweşî |
| **dilgiran** | dilzar, xemdar, mirûs |
| **dilgiranî** | mirûsî, xemdarî |
| **dilgirtî** | dilgîr, melûl, dilzarî |
| **dilgirtî** | qehirî, pest |
| **dilgirî** | kesasî, mirûsî |
| **dilhebûn** | dilkirin, dilçûn, qezû, niyaz |
| **dilhejî** | helçûn, çelqîn, arhan |
| **dilherişandin** | herifîna giyanî |
| **dilherişandî** | giyan herifî |
| **dilhişk** | dilreq, dilhesin |
| **dilhişkî** | dilreqî |
| **dilhiştin** | dilmayîn |
| **dilhiştî** | dilhêlayî, zîzkirî, torekirî |
| **dilîrî** | mêranî, kamîranî |
| **diljan** | dilêş |
| **diljanî** | dilêşî |
| **diljar** | qehirî |
| **diljarî** | qehirîn |
| **diljêmayî** | jêsîlbûyî |
| **dilkeçik** | tirsonek |
| **dilkeçikî** | tirs |
| **dilketin** | dilşorî |
| **dilketî** | evîndar |
| **dilkêş** | dilber, daylan |
| **dilkêşî** | dilberî |
| **dilkitok** | dilket, dilkutan, pirtepirt |
| **dilkiz** | pest, xemdar |
| **dilkizî** | pestî, xemdarî |
| **dilkuj** | xûnî, kijok, xwînî |
| **dilkutî** | dilkutan, pirtepirt |
| **dilkutkî** | dilerizin |

| | |
|---|---|
| **dillerz** | dilkutk |
| **dillerzî** | dilkutkî |
| **dillêdan** | siroş |
| **dilmayî** | xemdar, dilkul, xemkêş, serkiz |
| **dilmayîn** | serkizî, xemkêşî |
| **dilmend** | enirî |
| **dilmezin** | zîrek, çeleng |
| **dilnaz** | dilovan |
| **dilnazik** | dilnaz |
| **dilnerm** | aram, mêşîn, dilovan |
| **dilnewaz** | dilovan |
| **dilnizm** | bêfêz |
| **dilniya** | piştrast |
| **dilop** | peşk, dilopa avê |
| **dilopandin** | guhertina hilmê bo avê |
| **dilopandî** | hilma guhartî av |
| **dilopank** | amêra dilopan |
| **dilopkirin** | dilop derxistin |
| **diloprêj** | dilopank |
| **dilovan** | xweşevîn, dilşewat, mehrîban |
| **dilpak** | dilsoz, emekdar |
| **dilpakî** | dilsozî, emekdarî |
| **dilpaqij** | niyaz, yan mebest pak |
| **dilpaqijî** | niyaz yan mebest pakî |
| **dilpik** | tevir |
| **ditpîs** | bed, garis, çikos |
| **dilqe** | qilix, diyarbûn |
| **dilqewînî** | dilxûrtî |
| **dilrabûn** | dilşêvî, pirtepirt |
| **dilrast** | dilsoz, emekdar |
| **dilreq** | hov, bêdilovanî |
| **dilreqî** | hovî |

| | |
|---|---|
| **dilreş** | kîn |
| **dilreşî** | kîndarî |
| **dilrevîn** | rûbaz ciwan dilkêş |
| **dilron** | rastgo |
| **dilronî** | şadî |
| **dilsade** | kawûk, sakar |
| **dilsar** | sist |
| **dilsarî** | sistî |
| **dilsistî** | yên lawaz |
| **dilsot** | derd, xefet, şîn |
| **dilsotin** | şînî |
| **dilşa** | keyfxweş, şad |
| **dilşahî** | şadî |
| **dilşewatî** | dilhêlan |
| **dilşêvî** | pirtepirt |
| **dilşilî** | dilşorî |
| **dilşikestî** | melûl |
| **diltarî** | kîndar |
| **dilteng** | pest |
| **diltengî** | pestî |
| **diltepî** | weswasî |
| **dilter** | hestîsivik |
| **diltêçûn** | evînî |
| **diltijî** | dilniya |
| **diltîr** | kirêt |
| **dilvebûn** | dilçûn |
| **dilvekirin** | niyazpak |
| **dilvekirî** | eşkere rastgo |
| **dilûl** | hûştir |
| **dilxap** | çivo, fêlbaz |
| **dilxapî** | fêlbazî |
| **dilxûrt** | wêra, aza |

| | |
|---|---|
| **dilxûrtî** | wêrayî |
| **dilxwaz** | hîvî |
| **dilxwazî** | dilsozî, emekdar |
| **dilxwestin** | vêtin |
| **dilxwestî** | qezû, niyaz |
| **dilxweş** | vesihî |
| **dilxweşkirin** | vexandin, dilnewayî, behî |
| **dilya** | dilîhî, çav ladayî |
| **dilzar** | dilgiran, xemdar, pest, mirûs |
| **dilzarî** | dilgiranî, xemdarî, mirûsî |
| **dim** | nikil |
| **dimbik** | dinbik, dahola biçûk |
| **dimil** | dûmil, mil yan şanpan |
| **din** | yê yan ya dî |
| **dindik** | dindûk, dêndik, lib |
| **dinê** | dinya, cîhan |
| **dinêb** | firizî, zîwan |
| **dingding** | dengê daholê |
| **dink** | dengê hawên |
| **dinoyek** | girêç, qelebalix yan qerebalix, qerqeşe |
| **dinok** | garis pirtik |
| **dinav** | deme, katî, hinga, nav, navbera |
| **dipeyre** | paşî |
| **dipêşde** | li pêşiyê, berahiyê |
| **dir** | dirinde, hov |
| **diraf** | şikil |
| **diran** | didan, yak ji endamên hestiyên devî ku bo cûtinê bi kartînin |
| **dirane** | texlît, kirm |
| **dirankarî** | diransazî |
| **diranketî** | bêdiran yan didan |
| **dirankêş** | diransaz |
| **dirankilor** | diran korbûn |

| | |
|---|---|
| **dirankirosk** | dirankolk, darikê diranan |
| **diranşêlk** | diran hevîr |
| **dirav** | pere, pare |
| **diravgeh** | benk |
| **diravgenî** | destmiç, rezîl, çikos |
| **diravgûher** | pereguher |
| **diravî** | mayî, madî, darayî |
| **diravkod** | kasika pere yan para |
| **diraweri** | darayî |
| **diraxe** | gîdîşên bêderê ku ji dirûnê bêderê kom dikin |
| **dirbo** | peyva arandina beranî |
| **dirdar** | reşdar |
| **diredir** | zehêkirin |
| **direhî** | zevî yan şova kelisê kelş tê da |
| **direnđe** | dirinde, dir |
| **direndeyî** | dirhayî, peritî |
| **dirxe** | dara codî |
| **dirêj** | êrîş, pîv ya valatiyê yan demî ji xalkekê bo yekê din |
| **dirêjayî** | dirêjî |
| **dirêjbûn** | radan, vekêşan |
| **dirêjkirin** | berdana sererdê yan nivîna |
| **dirêjkî** | bi dirêjî |
| **dirêş** | derzî, simtok |
| **dirêşk** | derzîk |
| **dirf** | nîşan |
| **dirik** | stirî |
| **dirrî** | kelem |
| **dirindar** | têr dirî |
| **dirîn** | dirandin, çirîn |
| **dirix** | feramoş |
| **dirkandin** | pênasîn |
| **dêrkandî** | pênasî |

| | |
|---|---|
| **dirm** | mîkrop |
| **dirme** | kirm di nav û rê pezîda mîkrop |
| **dirmî** | kirmkirî |
| **dirne** | serbenda kunka meşkê |
| **diroje** | rokirin girar, têkirin |
| **dirok** | şirîn, didanê bir |
| **dirş** | vereşandin, hilavêtin |
| **direşk** | ala |
| **dirv** | bineret, binyat, nijad, hîm |
| **dirûst** | dirist, rast, qenc, baş |
| **dirûstkar** | rastkar rastok, rastyar |
| **dirûstkarî** | rastkarî, qencî |
| **dirûstker** | daner, çêker |
| **dirûm** | danan dirûn ya pêkanîn |
| **dirûn** | paleyî lêkdan dirûn ya dexlî, dirûn pêkanîn ya cilan |
| **dirûngeh** | jorên dirûnê (cil) |
| **dirûnker** | terzî, dirûnkar |
| **dirûnvan** | pale |
| **dirûnkirin** | dexil, lêkdan |
| **dirûnkirî** | dexil lêkdayî |
| **dirûşe** | hestiyê lingî |
| **dirûşim** | dirûv, şikil, nîşan |
| **dirût** | dirûd, silav |
| **dirûtin** | cil çêkirin |
| **dirûtî** | cil çêkirî |
| **dirûv** | girûv, nîşan, dirkandin |
| **dirx** | sofîtî |
| **dirxûn** | serdevk, nixêv |
| **diryaq** | teraqî |
| **diserde** | cîh da, dem û dest |
| **diserre** | ji selal |
| **di serde kirê girtin** | hevyazî |

| | |
|---|---|
| **dist** | sitil, niqrî |
| **diş** | dûçik, xûşka jinê û yan mêrî |
| **dişdaşe** | kirasê xizmetkariyê |
| **dişorandin** | bikaranîn |
| **dişorandî** | bikaranî |
| **dişorîne** | bikartîne |
| **diya bû** | diviya bû, pêviyabû, pêwîstbû |
| **divat** | derbestî |
| **divaye** | pêviyaye daxwaze |
| **divê** | diwê, diwî, bi vê û wê |
| **divêt** | pêdivêt, pêviyaye hez dike |
| **divediv** | givegiv, dengê bayê xûrt |
| **divêl** | diwêl, benik yan tayê kevlî yan çermî |
| **divêr** | dêvêr, dîwar |
| **divîl** | simtok, kunker |
| **divnak** | wergirname, pisole |
| **diwazde** | diwanzde, duzde, yan (deh û dû) |
| **diwemîn** | duwemîn, dûdûwa |
| **diwerîn** | hatin xwarê, barîn |
| **diwêt** | merekebdan |
| **dixe** | dek, fêl, çiv |
| **dixebaz** | fêlbaz, çivo, dekekar |
| **dixûm** | kîn, dexs, rik |
| **dixûrcilî** | şaşî şepirzebûn, tevdan |
| **dixwedîtiye** | di xwe ra dibîne  dikare |
| **dixwerim** | sond dixwe |
| **diya** | dê, dadê |
| **diyar** | xuya, eşkere |
| **diyarî** | xuyayî, bexşîn |
| **diyarîkirin** | pêşkêşkirin, na vekirin |
| **diyarbûn** | eşkerebûn, belobûn, ron |
| **diyar e ko** | heçko |

| | |
|---|---|
| **diyargeh** | hindav, çavdêrgeh |
| **diyarîtî** | ditane |
| **diyarîkirin** | pêşkêşkirin, bexşîn |
| **diyarok** | herzal |
| **diyatî** | daykîtî |
| **diyazilk** | texlît gûl |
| **diz** | şawî, destbir, kelişo, keleş, dizek |
| **dizanî** | dizîtî |
| **dizdar** | pasvanê keheyê |
| **dize** | dûz, kele |
| **dizî** | nihan, nihînî |
| **dizîbûn** | dizîkirin |
| **dizî dike** | didize |
| **dizê qulekî** | razdiz |
| **dizîtî** | karî dizînê |
| **dizok** | diz, dizek, keleş, kelîşo |
| **dizgeh** | kargeh |
| **dizgîn** | lîwan, germ, rûçik |
| **dizgûn** | qenc |
| **dizgûnkirin** | çakkirin |
| **dî** | ew yan ewa dî, dîtin |
| **dîbace** | perûkê avirmiş |
| **dîdar** | çav vêketin, çaw pêkewtin, dilber, dîmen |
| **dîden** | ditin |
| **dîdegeh** | dûtingeh (dêra dîtinê) |
| **dîdevan** | qelawiz |
| **dîdevanî** | çavdêrî |
| **dîdevangeh** | birca çavdêriyê |
| **dîdî** | peyva lêheytandina seyî |
| **dîh** | koma çiqan |
| **dîkan** | girovir |
| **dîkelok** | şilûv, dîkilê biçûk |

| | |
|---|---|
| **dîkil** | kelekok, kerebab |
| **dîklok** | têzek |
| **dîkilqaz** | dîkilî qazê nêre qaz |
| **dîkûmirişk** | yariyek gelêrî |
| **dîl** | kole, girtî, hejar, mendebûr, benî, êsîr |
| **dîlî** | êsîrî girtin, êsîrtî |
| **dîlan** | govend, dawet, helperkê |
| **dîlbaz** | pispor, şareza |
| **dîlbazî** | pisporî, şarezayî |
| **dilbend** | wergêr, terciman |
| **dîlbendî** | wergêran tercime |
| **dîlek** | lavekî, hêvîkirin |
| **dîlgeh** | rekeha tawankirinê |
| **dîlim** | texlît dîlan parçe |
| **dîlimkirin** | parçekirin, birîn |
| **dîlimkir** | birî |
| **dîlmar** | texlît mar e |
| **dîlok** | stran, goranî |
| **dîlokvan** | stranbêj |
| **dîmen** | bînayî, dîtin, dîdar, temaşe |
| **dîm** | dêm, erdê neavdayî |
| **dîmatî** | bajêrî, şarî |
| **dîm kefçik** | texlît balinde |
| **dîn** | xebe, şêt, har, ol |
| **dînkirin** | şêtkirin |
| **dînîtî** | şêtî, harî |
| **dîngeh** | şêtgeh, dînxane |
| **dîndar** | oldar |
| **dîndarî** | oldarî |
| **dînok** | şêt |
| **dînamêt** | maddeyek peqîniyê |
| **dînamîk** | zanistiya livînê |

| | |
|---|---|
| **dînamo** | alava kehrebê heldihêne, dizê |
| **dînayî** | şêtî, gêjtî |
| **dîq** | peyva dibêjin zarokî piştî veşartinê |
| **dîr** | dirinde, dehbe, canewerî hov |
| **dîra** | liyan |
| **dîrek** | karîte stûn |
| **dîrok** | mêjû |
| **dîrgîn** | dengê lepan |
| **dîroknivîs** | dîrokzan, mêjûnus, mêjûzan |
| **dîrokzanîn** | zanistiya dîrokê |
| **dîsa** | dîsan, carek dî, dûbare |
| **dîse** | pezê kûvî |
| **dît** | lêkerê berê yê dibîne |
| **dîtingeh** | dîdegeh |
| **dîtinî** | rû bi rû |
| **dîtî** | ber çavketî |
| **dîtir** | ew yan ewa dî yêdî, yadî |
| **dîtira rojê** | dû sibe (roja dûwem) |
| **dîv** | dûv, kilk, dever |
| **dîvelank** | peyrew, peyçûn |
| **dîwan** | civatgeh |
| **dîwar** | avahiyê berdewam û ber cest bo cuda kirina direkê |
| **dîwanxweş** | germe civat, şarandî |
| **dîz** | xilik, sindan, kûp, dîzik, amanê nîvişkî |
| **do** | dûh, dihî, donê, berî rojekê |
| **dob** | carek |
| **dobe** | hingiv yan hingivînê sepîkirî, bêqam şîrîn |
| **dobelan** | dombelan, qarçik |
| **dobjen** | bêjink |
| **dodank** | dewdank, meşk, dadik |
| **dojeh** | dûzex |
| **dojehîn** | dûzex |

| | |
|---|---|
| **dojek** | coka aşî |
| **dojeketî** | herdem di agirî da |
| **dojzir** | rêjgeya ava berê aşî |
| **dol** | newal, nihal, nijad, dûwêl |
| **dolab** | dolav, amêra destiya ristinê, xezneya cilan, livîn, xap, deke, fêl, çerxa guhêzokê,otombîle |
| **dolabok** | alava veşirandinî çirk |
| **dolabreş** | karkera ristinê |
| **dolabrêsî** | ristin |
| **dolabac** | pêç |
| **dolar** | pereyê Emerîka |
| **doldank** | hêsk |
| **dolgeh** | koz yan çereya nihalê |
| **dolik** | nihala biçûk |
| **dolîdank** | colan, deydik dêdî, hêlekan |
| **dolkan** | çep û çîr |
| **dolîdank** | diyarî, bexşîn |
| **dolmatî** | karesat, derd kost kembaxî |
| **dolmik** | zirtik, kulind, kose |
| **dolmend** | dewlemend, zengîn |
| **dol û dehil** | nihala têr dehil |
| **dolpî** | dûpişk |
| **doman** | koç, qonax, dû, dûkel |
| **dombel** | dombela, yariyek gelêrî |
| **dome** | qereç, aşiq, boşe |
| **domkeş** | wize, taqet, hêz, berdewamî, binbarî, rakêşan |
| **don** | duhn, zihûm, ron, çewrî |
| **donêgazê** | ronê gazê |
| **donêgenekê** | ronê gerçekê, rone zikçûnê |
| **dong** | dûng, dûvkê qelewê mihê |
| **dongî** | hetapaşî, tadawî, tadûmahî, qelewî, hiş, hizin |
| **dope** | birmil, pîp |

| | |
|---|---|
| **doq** | gurz, nitir yan neqş |
| **doqik** | kutek, mîkût |
| **dor** | hesû, asû, serfîs |
| **dorahî** | dorî, dorayî, kemere |
| **doran** | asû |
| **dorandin** | ziyan, jêçûn |
| **dorbend** | erkdarê kargêriyê |
| **dorbeş** | nîşana dabeşkirinê |
| **dorevan** | parêzkar, parêzyar |
| **dorez** | gûstêrk, gûlîsk, engûste |
| **dorhêl** | li dor |
| **dorêj** | mifş, cor |
| **dorqerîş** | zivirok |
| **dorik** | kilor nanê girover ê nerm |
| **dorlêgirtin** | gemaro |
| **dorlêgirtî** | gemarogirtî |
| **dorpêç** | kêlek |
| **dor û pişt** | jîngeh |
| **dost** | heval, yar |
| **dostan** | asinkê bin qazanê |
| **dostanî** | dostîtî, hevalî |
| **dostî** | hevalîtî |
| **dostik** | yar |
| **doş** | doşandin, dotin |
| **doşav** | xweşav |
| **doşandî** | dotî |
| **doşanî** | pezê têr şîr |
| **doşavî** | mot, şîrêza tirî |
| **doşek** | nivîna li ser nivistinê |
| **doşekbalîv** | yariyek gelêrî |
| **doşîn** | dotin |
| **dot** | qîz, keç |

| | |
|---|---|
| **doten** | derd, êş |
| **dotmam** | keça mamê yan apê |
| **dotmîr** | keça mîr |
| **dox** | doq, amanek darî, tîr û her tiştê tîj, awa bar, simê hestirê |
| **doxe** | doşane, pez yan çêla li nik mirovê kû her feyde di şîrî dike |
| **doxhevsar** | reşme |
| **doxîn** | benikê şerwalî |
| **doxman** | gelac, ewan, xiniz |
| **doxmanî** | xinizî, bêbextî |
| **doxrem** | zeleteya arû xiyar li gel mastî, jajîk |
| **doz** | tol, heyf, pirs daxwaz ceng |
| **dozdar** | dozekar, gilîkar |
| **dozdek** | deste, dûwazde |
| **dozkirin** | gilîkirin |
| **dozkirî** | gilîkirî |
| **dozname** | gilîname, kurtiya daxwazê |
| **dozaşehrewî** | giliya jivarî |
| **dozaguneha** | giliya sizayî tawankarî |
| **doza olê** | giliya olî, mafên dînî |
| **dozan** | qîzan bo tiraşînê |
| **dozxwaz** | gilîkar |
| **dozxwazî** | daxwaz |
| **du** | dûdû, dido |
| **duav** | vekêtin yan rêjgeha dû rûbaran |
| **dubare** | dûcar |
| **dubend** | dupartî û duberek |
| **dubendî** | du berekî |
| **duber** | dara salê du car berî dide |
| **dubere** | bizina salê ducar avis dibe |
| **duberî** | neyarî |
| **dubeş** | duker, du parçe |
| **dubeşkirin** | duparçekirin |

| | |
|---|---|
| **dubirank** | helo, laçîn, şehbaz, baz |
| **dubîn** | xêl, çavêr, çavla, çavxêl |
| **dubinî** | çavêrî, xêlî, dudîtinî |
| **ducan** | avis, zikpir, bitişt |
| **ducar** | dubarek |
| **dudev** | du rû |
| **dudevok** | tefşoyê du ser |
| **dudil** | teloq, gomandar, nepiştrast |
| **dudilî** | gamandarî, nepiştrastî |
| **dudilbûn** | gomandarbûn |
| **dudilkar** | gomandar, gomankar |
| **dudilkirin** | gomankirin |
| **duguh** | navê awazek rojhelatî |
| **dugisin** | dugêsin, kêlana dûcariya erdê |
| **duguh** | darikê dû serik bo helkêşana stiriyan |
| **duguman** | qelew |
| **dugur** | texlit berika pembuyî |
| **duh** | duhî, do, donê, berî rojekê dihî |
| **duhala** | avis, bizik, bizar, giran, bi tişt |
| **duhalî** | duhala |
| **duhin** | zihum, çewrî |
| **duhmek** | bêhnek, gavek |
| **duhik** | çirke |
| **duht** | spîkirin kiras, bêreng kirin |
| **duhtin** | spîkirin, bêrengkirin |
| **dujin** | mêrê bi du jin |
| **duker** | pisûparî |
| **dulavrêsk** | texlît balinde ye |
| **dulke** | dewlik, tirarek mezin e |
| **dulet** | duker, duparçe |
| **duletkirin** | dukerkirin, duparçekirin |
| **duletkirî** | dukerkirî |

| | |
|---|---|
| **dulîn** | masiyek deryayî dulfîn |
| **dumahî** | mayî, dawî |
| **dumeqes** | duvmewes, hechecik, hacîreşk |
| **dumduk** | kûke, dunkul, hudhud |
| **dumil** | mil yan şan pan |
| **dummar** | toza tutinê arvanê |
| **dundul** | huştir |
| **dumuhr** | texlît hesp e |
| **dunbig** | dahola biçûk, dimbik |
| **dung** | ding, dûvê pezî (mih) |
| **dunikan** | nîşan (-) û nîşan (()) |
| **dunîv** | dukerên yeksan |
| **dunikil** | dawûde dunikil, dudika dunikil |
| **dunya** | cîhan, zemîn |
| **dupat** | duqat, piştrast dike |
| **duqozî** | dugoşe |
| **dur** | elmas |
| **durawest** | nîşana destpêka axiftinê (:) xal |
| **durb** | nîşan xalî |
| **durdan** | kur, zaro, mindal |
| **durdî** | wata di mem û zînê de |
| **dureng** | du rû, rûbaz |
| **durengî** | rûbazî |
| **durev** | ciyawazî |
| **dureşan** | du al yan layên yeksan |
| **durê** | durêyane, yektir birîn yan ciyawazbuna rêyan |
| **durgeh** | girav biçûk |
| **durih** | melez |
| **durû** | rûbaz |
| **duruf** | durf, nîşan |
| **durust** | dirist, rast |
| **durûv** | rûçik, şon |

| | |
|---|---|
| **dusibe** | du roj dî |
| **dusim** | canewêrên du sim |
| **dustan** | dostan |
| **duşane** | duxane |
| **duşembe** | duşem, roja duşembê |
| **duşivan** | alîker yan harîkerê şivanî |
| **dûşvan** | kîndar, kotî, çepel |
| **duta** | canewêrê xûrt, duqat, çemîn, du telîs |
| **duvmisas** | kahîn, balindeyê deng dike hemî şevê şevşevok, bar, çimak, pîrçemek |
| **duwane** | cêmik |
| **duwazde** | deh û dû |
| **duwazdehem** | duwazdehemîn |
| **duwêl** | qayişa kevlî yan çermî (wek ya demjimêrê) nihalek firê û têr çep û çîr |
| **duxman** | fêl |
| **duyeng** | duyem |
| **duzam** | lareg, gunî |
| **duzerik** | hêka du zerik tê da |
| **duzil** | bilûr, şimşal, ney, zurna |
| **duzilvan** | zurnavan, neyjen, neyvan |
| **duziman** | rûbaz |
| **duzimanî** | rûbazî |
| **duzîn** | mehîna çar salî |
| **dû** | kadû, dûke, dûkel, dûman |
| **dûbe** | şelî |
| **dû çerx** | dûçerx, baysikil |
| **dû çik** | terî, dûv, kelk, rihên dû çiq boçik |
| **dûdan** | dûvçûn |
| **dûdayî** | dûvçûyî, şeqandin |
| **dû deman** | regez, nîjad |
| **dûdil** | dudil |

| | |
|---|---|
| **dûgûh** | duguh |
| **dûgulî** | çetel |
| **dûhû** | dihî |
| **dûj** | xûnkêş |
| **dûjezer** | dera derketina ava aşî |
| **dûk** | dûx, serê teşiyê |
| **dûkelkêş** | kolîn, pixêrik, rojin |
| **dûker** | dûparçe |
| **dûketin** | dûdan, şeqandin |
| **dûketî** | dûdayî, şeqandî |
| **dûlab** | dulav, xirxal |
| **dûm** | koz, pawana peziya zivistanê |
| **dûmahîk** | dûmahî, dawî, kotayî |
| **dûmak** | bizina şîrî dide dû berxan yan kehrikan |
| **dûman** | dû, pêmayî dûkel |
| **dûmat** | tomat, derd, êş, karesat |
| **dûmihir** | dewarê bêxêr |
| **dûmik** | mukul, nikil |
| **dûn** | don, duhn, ron |
| **dûndan** | dûnde, tov |
| **dûnpas** | birgeya dawiya peyvê |
| **dûpişk** | dolpî |
| **dûpiştikî** | hevwate |
| **dûqan** | mûxtar |
| **dûr** | pîva, valatiyê ji derekî bo dereke din, wê ve |
| **dûra** | şûn da, paşî |
| **dûrahî** | dûrayî, dûratî, kûratî, cûdabûn, wêveyî |
| **dûrangeh** | sirgûm |
| **dûrbîn** | berçavika dûratiyê, jîr |
| **dûr dibîne** | ji dûr nas dike |
| **dûrbihîstok** | telefon |
| **dûrdest** | ne li berdest |

| | |
|---|---|
| **dûre** | çêmabe |
| **dûrger** | dûr diçe |
| **dûrgeşt** | gerîde, geştvan |
| **dûrgirtin** | xavedan |
| **dûrik** | dîrok, kurtestran, awazek duwane |
| **dûrikvan** | dîrikvan |
| **dûrî** | duratî |
| **dûrketin** | dûrtir |
| **dûrkirin** | dûrxistin, nistan, sirgûmkirin |
| **dûrkirî** | dûrxistî, sirgûmkirî |
| **dûrniye** | çêdibe |
| **dûrtir** | wêvetir |
| **dûstan** | şîşa tifikê yan bista tifikê (koçkî) |
| **dûşab** | xweşav, memaze, şîrêza tirî |
| **dûşaxe** | qûrbeqe |
| **dûşivan** | dû şivan |
| **dûtin** | dû wîn, hinîna dîwaran |
| **dûtiş** | dû ker yan let |
| **dûvask** | ser (selal) çavî |
| **dûvdehol** | mîşexwer, terefe, lakot |
| **dûvdirêj** | balinde ye |
| **dûvek** | kolpek, perwank, bazinê stûyî |
| **dûvik** | şûrik |
| **dûvk** | destikê gêsinî |
| **dûvmisas** | dûvmisas |
| **dûvra** | dûra, piştre |
| **dûvrepik** | çûçika dûv rep |
| **dûvrûvî** | texlît heleze |
| **dûvsing** | texlît kuliye dûv reqe |
| **dûvsork** | hirmî |
| **dûz** | rast, kele, rêkar, diz |
| **dûzan** | dozan |
| **dûzex** | dojeh |

# E

| | |
|---|---|
| **e** | tîpa şeşema elfabê ya kurdî |
| **e** | lêkera bûvêye li dawiya peyvê tê bi watayê erê |
| **ebane** | Hevpişk |
| **ebanos** | ebenos, texlît dar |
| **ebdal** | Ladayî |
| **ebeboz** | hejar, bêkar, belengaz |
| **ebebozî** | hejarî, belengazî |
| **ebesor** | çîna xanedana civaka kurdî ku ebayên sor dikin serê xwe |
| **ebloqe** | gemaro, dorgirtin |
| **ebone** | abone, pişkdarî, beşdarî |
| **ebr** | Ewr |
| **ebrî** | eprî, dersoka avirmiş |
| **ebûr** | Hevjiyan |
| **ebûrî** | aborî, jiyan, hebûn |
| **ecê** | keçê peyva dibêjin keçê [bo kurtiyêl |
| **ecûr** | arû, havêtî |
| **ecir** | kirê, miz |
| **ecî** | dapîr, pîrik |
| **edab** | Nêm |
| **eda** | edakirin dan wek deynî |
| **efare** | tilp, paşmayî |
| **eferîn** | aferîn, destxweş |
| **efraz** | evraz, pal, pesar |
| **efsar** | Hefsar |
| **efsane** | Çîrok |
| **efsanwer** | keşe, qeşe |
| **etşani** | awazek meziqeya rojhelatî |
| **efrîqya** | qareye [kert] kîşwe rek |

| | |
|---|---|
| **efser** | serbazê, payedar |
| **efşarî** | awazek musîqeyê rojhilatê |
| **efşûs** | mixabin |
| **efteft** | rewîn |
| **efyon** | tezînker, tiryak |
| **efzûn** | maldar, dewlemend |
| **eger** | ger, meger, amêrê mercê sedem ho wekî |
| **egerçî** | her çend ko |
| **egerna** | eqîna nexwe |
| **egîd** | fît, leheng, qehreman, qareman |
| **eheh** | dengê lêheytandina pezî ye |
| **ehl** | al, sorê vekirî |
| **ehrîman** | xudawendê bediyê |
| **ehûre** | xûdawendê qenciyê li nik zerdeştiyan |
| **ehûremezd** | xûdayê esmanan |
| **ejder** | ejdeha, ziya |
| **ejdeha** | zeha, mezin (mexasime mar) |
| **ejik** | texlît mîweye |
| **ejnû** | ejnû, çok, çong |
| **ek** | spiyê çêlî |
| **ekfî** | xencera qefqasî |
| **elalet** | elavî, elawî, şewat, gurî, aporî, girs, solasat |
| **elavî** | gûrî [agir] |
| **elçî** | êlçî, balyoz |
| **eleste** | roja qiyametê |
| **eletewş** | tewş, bê feyde |
| **elemî** | temezî, fotika jinê |
| **elfabê** | tîpên nivîsînê |
| **elîh** | eloh, eylo, baz, başok |
| **elmas** | dûr |
| **elo elo** | elok, eloşîş |

| | |
|---|---|
| **elo** | helo, gaziya telefonê |
| **elqerê** | elqerêz |
| **elqo cangirtin** | girnijîna zeblekan [masulkeyan] |
| **eleminyom** | texlît maden e [mêrtal] |
| **elû** | eylo, helo, baz |
| **elûc** | hilîk, hirmîk |
| **elûh** | balindeyek biçûk e, eylo baz |
| **em** | cînav yan ranav, nîşana axaftinkerên kom |
| **eman** | aman, qazan, bi çembil |
| **emaney** | mewdayê vesihînê, mawe |
| **emas** | amas, siroş kulbon, penman |
| **embar** | enbar, depo |
| **embaz** | nimûne, mînak |
| **emek** | emeg, dilsozî, qencî |
| **emende** | qerzdar, deyndar |
| **emraz** | taxim, amêr, ûlav, kereste, kerese |
| **emtîke** | kevnar, ecêb |
| **emtîkexane** | kevnarxane, mûzexane |
| **encam** | dawî dûmahî |
| **encil** | Incil, kitêba pîroz a filehan |
| **encumen** | komel, civat |
| **endam** | lebat |
| **Endamê karker** | endamê erkdar |
| **endaz** | xwedî, xûdan, xawen |
| **endaze** | pîvan, tibab |
| **endezyarî** | zanistiya endazeyê |
| **endazwer** | endazyar |
| **endazî** | pîvan |
| **endeskar** | kargêr |
| **endesker** | kargêr |
| **endîşe** | hizir, aşop, raman |

| | |
|---|---|
| **endişenak** | şaş, sergerda, perîşanî, şepirzeyî |
| **endîz** | debarekirin |
| **endûz** | erkdar |
| **engîz** | rohn |
| **engûşt** | sertilî |
| **enirî** | tore, dilmayî, xeyidî, sil |
| **enî** | tewêl |
| **enîşk** | mirik, kune, goşe |
| **enîşkdan** | lêdana bi mirikî |
| **enterî** | emterik, eba ye, zelamî, serkiras, kirasê derveyî yê jinê; kurt li pêş, dirêj, li paş |
| **entî** | entîn, dûdilî, di axaftinê de |
| **enzêl** | textê nivistinê ji pasî yan zilkan çêkirî |
| **epî** | peyva handana zarokî da ko bixwe |
| **eprex** | delgên, tirî yên lênayî, dagirtê bi birine û qirnê |
| **eprî** | dersoka avirmîs |
| **eqîd** | doşava tîr |
| **er** | emraza mercî, an ko, emraza ecêbgirtinê |
| **eran** | goman |
| **erbab** | armanc, mebest, merem |
| **erbane** | erebane |
| **ereb** | millet, netewe |
| **ercen** | çene, erzînk |
| **erdnîgarî** | erdnasî |
| **ereqvexwer** | meyvexwer |
| **erese** | bazarê zerzewatî yan sewzî |
| **erê** | belê, herê, pêkhatin |
| **erêkirin** | erêyî |
| **erêkirî** | erêyîkirî |
| **erênî** | belêyî |
| **erêna** | dûdilî |
| **erênîn** | enirîn, xirênîn |

| | |
|---|---|
| **erê û nerê** | bivê meyê |
| **erişandin** | herişandin, şikandin, birhandin |
| **eriz** | hevrist |
| **erîn** | gaz, geza, bazirganî, dirêjiya destî |
| **erjen** | korik |
| **erk** | pek, hek, pêwîst |
| **ermîxan** | yadîkar, diyarî |
| **ertûqî** | hertoqî, hirtoqî, zendiqî |
| **erûk** | xox çiçelok |
| **erûl** | erûl |
| **ervan** | ar, ard |
| **ervaz** | kele |
| **erx** | kelş, kor, çal |
| **erxewan** | mor, argon, xemr |
| **erxewanî** | morî, xemrî |
| **erxenûn** | amêrek musiqêye |
| **erzan** | kêm beha |
| **erzanî** | kêm behayî |
| **erzankirin** | beha kêmkirin |
| **erzankirî** | beha kêmkirî |
| **erzen** | garis, baçik |
| **erzîn** | rih, erzînk, ezîng, lam, navda |
| **eseh** | ese, piştrast, temam, Bêgoman |
| **eskenc** | êş [zik], azar |
| **esker** | leşker, serbaz |
| **eskerlad** | taya sor |
| **esmer** | genimî, reng, qehweyî |
| **esmîn** | yasemîn, gûl |
| **espan** | texlît helez e bo dest şûştinê bikar tê |
| **espanax** | spînax, zerzewatê têr asin |
| **espender** | spend, espend, helezek pijişkiye belg tale |

| | |
|---|---|
| **esrince** | hestiyê kemaxê |
| **estûr** | stûr, kûratiya mezina navbera du rûyên berhev yan beranber |
| **eşbabî** | qeysr, zerdeleyên hişkkirî |
| **eşk** | hêstir, rûhnik, rondik, firmêsk |
| **eşkerakirin** | ravekirin, diyarkirin, ragehandin |
| **eşkerekirî** | şirovekirî |
| **eşkene** | metfînî, avgoşt |
| **eşot** | aşût, herifîna berfê |
| **eşq** | evîn, evînî |
| **eşqelî** | leyî, tofan |
| **etax** | altax, xiniz, sîxor |
| **etek** | rex, tenişt, kenar, qerax, kêlek |
| **etles** | kitêba erdnîgariya wênekirî, texlît perûk |
| **etûn** | veytûn, kûrhe |
| **ev** | eve, navê, nîşanê |
| **evan** | navê nîşana komê |
| **evayaye** | Eve |
| **evdal** | hejar, belengaz |
| **evdalî** | hejarî, belengazî |
| **evî** | ev, navê mêzikê nîşanê |
| **evîn** | evîndarî, viyan, hez, seydayî |
| **evdîn** | tol |
| **evende** | hingê |
| **evîn** | eve |
| **evîndar** | şeyda |
| **evînde** | wê gavê |
| **evqas** | evçend |
| **evor** | gîsk, yek salî |
| **evra** | bilind, berz |
| **evran** | hevran, spîndar, qewaş |
| **evrayî** | bilindî, berzî |

| | |
|---|---|
| **evrazî** | Jorekî, ber jûnîve |
| **evrest** | hevrist |
| **evro** | evroje, îmro, îro |
| **evser** | efser, gerdceng |
| **evşî** | hevşê, gom, gov, pawan |
| **ew** | ewê, (mê) ewî (mêr) ew,Hemî |
| **ewan** | ew, komek |
| **eware** | paşxistin |
| **ewaha** | ew (mê) |
| **ewahane** | ew (mêya dûr) |
| **ew çend** | ta radeyekê |
| **ew emîn** | emîn bo bersîva ew kî ne? |
| **ewende** | bi wê tibabê yan çendê |
| **ew ez im** | bersiva ko her bi tenê ye |
| **ewin** | gelek |
| **ewiz** | libit |
| **ewrandin** | hewandin, penakirin |
| **ewrandî** | penakirî |
| **ewîl** | xûrt, genc, law |
| **ewko** | yê ko |
| **ewle** | bawerî, hemet, qîm |
| **ewlebûn** | penageh |
| **ewleyî** | hemet, qîm |
| **ewqas** | ew çend, tibab, ew qeder, hinde |
| **ewr** | givole hewr, ecac |
| **ewrûpa** | qare [kevne cihan yan dinya] |
| **ew kî ye** | pirsyar ko çi kes e |
| **ew kî ne** | pirsyar e ko çi kes in |
| **ewşandin** | nehêlan |
| **ewzenen** | amanên mêza xwarinê |
| **exsîr** | dîl, êxsîr, reben |

| | |
|---|---|
| **exte** | kidîş, hêstir |
| **extekirin** | xesandin, stewrkirin |
| **extekirî** | xesandî |
| **exterme** | hesp, dizîn, talanî |
| **extexane** | tewle, borxane |
| **extirme** | ewr, hewr, hesp, dizîn, talanî |
| **eyarşîr** | meşk |
| **eydî** | êdî, nexwe nexû |
| **eylûl** | heyva êlûnê |
| **eyne** | xudik |
| **eylo** | baz, helo |
| **eynî** | heynî, ênî, roja dawiya heftiyê |
| **eywan** | civatgeh |
| **ez** | min, ranavê kesî tek |
| **ezberkirin** | ji ber kirin ezbet malbat |
| **ezd** | hoza zerdeştî |
| **ezfer** | gulav |
| **ezgerî** | çakkirin |
| **ezî** | xwedî |
| **ezîtî** | xwedîtî, xwebînî |
| **ezman** | esman, valatiya bilind |
| **ezmîn** | stêra cemserî |
| **ezmûn** | taqîkirdin |
| **ezmûnê devkî** | taqiya zanetî |
| **ezmûnê nivîskî** | taqiya nivîsîn |
| **beşa Selah Sadallah li vir diqede û tîpên ji vir û pê de yên celadet Alî Bedirxan in.** | |
| **eba** | ebe, serpiyê ku li her welatî goreyî edeta wî cî an mezin an biçûk dibe. eba gundiyan, eba hezoyî |
| **ebanos** | darê ebanosê ê bi nav û deng |
| **ebûr** | ebûr, debar, îdare. îsal dê bikarim ebora xwe bikim. |
| **ebûrî** | celebek destmalên serpêçê, destmalên ebûrî |
| **ecel** | dema mirinê, ew sat. ecelê filan hatiye. |

| | |
|---|---|
| **ecele** | bi lez û bez. divê tu ecele werî. |
| **ecemî** | nezan, nu kargirtî. filan ecemî ye. |
| **ecêb** | herçî, derî adetê. ez li vê kira wî ecêb mayî mam, filan eciban dike. |
| **eceblosik** | kesê ku cil û rûyê xwe diguhere, heya kes wî ne nase |
| **eceblosî** | ji bo xwe ne dan naskirinê cil û durvê xwe guhartin |
| **ecibandin** | qîma xwe û kêfa xwe ji tiştekî, an kesekî re anîn. min filan gelekî eciband. |
| **eczaxane** | dikana dermanfiroşiyê. min derman ji eczaxanê kirî. |
| **eda** | bi cîh anîn. min wacibê xwe eda kir. |
| **edab** | kêm, mêm, givart, şêj. birîna min edab girtiye. |
| **edeb** | bîrbirina kira ku divê bibe, terbiye, filan têr edeb e. |
| **edebdan** | hînî, edebê kirin |
| **edilandin** | rastkirin, çêkirin, başkirin. min karê wî ediland. |
| **edilîn** | rast bûn, baş bun, çê bûn. filan baş ediliye. |
| **edimandin** | xirakirin, pîskirin |
| **edimîn** | xira bûn, pîs bûn |
| **efare** | zadê ku di nav axa bênderê de, meyweyê kerik ku li ser darê dimîne, pîsê her tiştî efare ye. |
| **efçikîn** | xwe civandina ser hev. filan di cihên teng de diefçike. |
| **efacan** | beradayî, ne rihet |
| **efiw** | lê borîn |
| **eg** | bizina gewra ku tê de qijî bête dîtin |
| **egal** | ben mê reşik ê ku ereb didin serê xwe, egala mirizî |
| **egîd** | mêrxas, boke |
| **ehd** | gotina ku mirov dide û pê tê girêdan |
| **ehmeq** | serhişkê nezan, rastî nezan, ji riya çep ve negerîn |
| **ehmeqî** | wek ehmeqan kirin, an gotin |
| **ejderha** | marê pir mezin, ji marên çê re jî dibe rûçik, wek. filan ejderhakî mêran e |
| **ejnû** | jinû, çak |
| **eks** | îrnadî. bêdilî. filan her eksa min dike. |
| **elam** | hay, xeber. wî elam neda min ku tu hatiye! |

| | |
|---|---|
| **elamet** | nîşan |
| **elbekî** | tasa bi dûvik |
| **elb** | kod, tilm, welçek, ji dar çêdibe |
| **elbik** | elba biçûk, ji bo êxistina tiştan |
| **elbom** | defteroka ku resman têxin nav |
| **eleg** | bêjinga hûr ku pê ard bêjing dikin û kepekê jê derdixin |
| **elektirîk** | ew qûweta ku pê makîne digerin û roniyê jî dide |
| **elemdar** | xwedî elem, serdar, xurt |
| **eletewş** | kira bê fêde |
| **etîbûrdo** | nanê ku ji çend celeb zad çêdibe |
| **elîqûrne** | kaxeza gewr a mezin bir |
| **elorî** | dema bihn dikeve nêrî û radike ser bizinan. nêriyê me elotî bûye. |
| **em** | pironav, an ber nav, herşiyên diyar, ez tu ew, em hûn ew |
| **eman** | gazî xwestin, bext. emana wî nîne. mirovekî bê eman e. |
| **emanet** | tiştê ku yek dispêrê mirov ji bo parastinê |
| **emayîr** | kullikê istûnê |
| **embar** | cihê ku zad tê de vedişêrin |
| **emek** | westa ku mirov ji bo yekî dikêşe. emekê min ber çavên wî bigire .. |
| **emekdar** | kesê ku di ber mirov de diwestê. filan emekdarê me ye. |
| **emel** | hêvî |
| **emlik** | berxê nû bûyî li ber şîr, berî ku çêrê bixwe |
| **emir** | ferman. li ser emira te ez çûm. |
| **emirber** | berdevk, kesê ku li benda emira yekî ye |
| **emirname** | kaxeza ku emir tê de hatî nivîsîn. emirber emimame anî. |
| **emr** | dema jîna yekî. emrê min giha pêncî salî. |
| **enab** | yari, diranê yekane ku dewarê yeksim piştî sala heftan bi derdixe |
| **enbarî** | texlîtek avahiyê ku girover lê dikin |
| **enirandin** | xeyidandin |
| **enirîn** | xeyidîn |
| **enitandin** | qehirandin, ekisandin |
| **enitîn** | qeherîn, ekirîn |

| | |
|---|---|
| **enî** | henî, pêşiya serî, di ser çavan re. eniya fireh îşareta jîrbûnê ye. |
| **enîşk** | zivoka mil di ser zendê re, enîşk serê kûçê |
| **ent** | rik, dilgiranî. enta min li wî tê. |
| **epartiman** | xaniyê ku ji bo rûniştina pir malan çêdibe. |
| **epê** | hepê, gotineke ji zarokên ku bi ziman neketine re tê gotin, yanê bixwe |
| **epolêt** | hîşanên ku datînin ser gurmikan |
| **eqil** | mêjû, bîr. min da eqilê xwe kurê te zor biaqil e. |
| **eqilmend** | xwedî eqil. eqilmendê me filan e. |
| **eqilmendî** | xwedî eqil bûn. hingê ev eqilmendiya te li ku bû. |
| **eqîq** | kevirekî qencbiha, rengê wî sorê tarî ye |
| **erd** | axa ku em li ser digerin, di erdê re kirin |
| **erdek** | eyirdek |
| **erebane** | defa ku şêxik bi destan lê didin |
| **erebe** | paytona ku bi hespan tê kişandin, erebê baran |
| **erefat** | navê çiyakî li hîcazê |
| **ereq** | ji ava tirî çêdibe û mirov pê serxweş dibe |
| **ereqxwer** | kesê ku ereqê dixwe |
| **eresat** | cihê ku mehşer lê çêbe |
| **erese** | cihê ku meywe û kes kayî tê de tê firotin |
| **erê** | belê |
| **erin** | xeyd. ew ji min eriniye. |
| **erixandin** | di ser re birîn. me rezên xwe doh erixandin. dar erixandin. |
| **erixîn** | di ser re hatin birîn |
| **erîn** | eriyan, erandin |
| **ernok** | kesê ku zû dixeyide |
| **ernokî** | ernak bûn |
| **erzan** | ne biha |
| **erzanî** | erzan bûn, ne bihayî |
| **erzen** | herçen, herzîn, senî, çenge |
| **erzêl** | ku ng iyên ku li nav re zan li ser çar darên bilind çê dikin |
| **esansor** | amêrê ku bi hikmê elektrikê mirov hildide avahiyên bilind |

| | |
|---|---|
| **esas** | hîm, bingeh |
| **eseh** | pirsîn, ma rast, an herhal |
| **eselî** | babetek, destmalên serpêç |
| **esil** | kak, riç |
| **esilzade** | kurê malmezinan |
| **esîde** | hesîde, celebek peloka ard, rûn û şekir |
| **esker** | leşker |
| **eskûdarî** | celebek destmalên serpêçê |
| **esmer** | reşegûn |
| **esraq** | binban, maxên di xanîkî de bi tevayî dibin esraq |
| **eşîr** | êl, qebîle. eşîrên kurdan gelek in. |
| **eşkere** | berbiçav, ne bi dizî, bi haya hinekan |
| **eşq** | evîn. hezkirin, delalan |
| **et** | etik, xweha mezin |
| **etar** | çerçî, ê ku pirtal li gundan digerîne û difroşe |
| **etfik** | uşiyê tirî ê biçûk. cûrik |
| **etlahî** | mecal. kês. ji hev birîn |
| **ev** | ê berçav va, ev tişt ev merî |
| **evd** | evdîn, tol, heyf |
| **evdal** | reben, bextereş |
| **evdalî** | rebenî, bexteresî |
| **evîn** | eşq, hezkirin |
| **evînî** | eşqi, ê ku hez kiriye, aşiq |
| **evleg** | qasek, ji erd, nîv dunim |
| **evraz** | hevraz, riya ku berjor hildikişe, kaş. terşê wî nişûv |
| **evreng** | |
| **ew** | pirorav, an bernav yanê kesê nediyar. ew hat, ew çû. |
| **eware** | bêkêr, netewa |
| **ewareş** | bayê xûrt |
| **ewiqandin** | bi şûn de dayin, bi derengî xistin |
| **ewiqîn** | bi şûn de mayîn, bi derengî ketin |

| | |
|---|---|
| **ewle** | bawer. ezji wî ewle me. |
| **ewlehî** | ewlehî, bawerî. ma ewlehiya te bi min nayê? |
| **ewr** | hilma avê ku li ezmanan wek pêlên dûmanê diçive û dibe baran |
| **ewran** | ewrên ku jê baran tê xarê |
| **ewravî** | dema ewr û sayî tevlîhev, ro heye û baran tê. dinê ewrevî ye. |
| **ewte ewt** | bi dengê bilind peyva sar û bê mana yanê wek reyîna sehan |
| **ewtîn** | kewtin, reyîn, lêketin |
| **exlaq** | sincî, tevayiya rûçikên qenc |
| **ey** | aletê bang ey filan |
| **eyal** | za r û zêç |
| **eyan** | xuya, berçav diyar |
| **eyar** | zanîna dereca qencî an xirabiya tiştekî. ez eyarê wî baş dizanim. |
| **eyar** | meşka debax bûyî, eyarê şîr |
| **eyarşîrk** | eyarê ku şîr têxinê |
| **eyb** | fuhêtî. ez eyb dikim ku bi kesên xermexwar re bimeşim. |
| **eybdar** | kesê ku kirên bi eyb dike |
| **eylo** | teyrêki dirinde û pir xurt |
| **eywan** | dîwan, nîsteqeha padişahan, mîrekan û hakiman, eywana kîsra |
| **ez** | piranav an bernavê ku dipeyive ez ldiyarl, tu [pêşber]. ew [nediyar] |
| **ezab** | êş, renc, cefa |
| **ezbe** | qapsûna ku têxin dawiya fîşekê |
| **ezep** | bêkar, nezewicî, jin nekirî, mêr nekirî. filan hê ezep e. |
| **ezibandin** | êşandin |
| **ezimandin** | dawet kirin |
| **eziyet** | êş, ezab, renc |
| **ezman** | valahiya di ser erdê re ku tê de ro, hîv û stêrk dixewinin. ezmanê şîn |
| **ezmandev** | ezmanê dev, ra serî ziman |
| **ezmanî** | reng ezman di rengê ezmên de |

# Ê

| | |
|---|---|
| **ê** | hîn, diha, ê de bêje hîn çi bû? |
| **êdî** | nema, diha. êdî ez nayêm cem te. |
| **êdîn** | ne ev, êdîn |
| **êge** | aletê ku pê ji hesin an depan radikin, dûz û hillû dikin, kêr û das û tefşoyan pê tûj dikin. |
| **êl** | qebîle, eşîr, tebeqe |
| **êlek** | berradayî, pîs bêkes, kesê ku xwe di sitoyê xelkê de dike bar. |
| **êm** | alif, xwarina dewar û pez. me pez êmkir. |
| **êmdan** | dema êm. êmdayîn |
| **êmidî** | emcûr, xitik |
| **êmiş** | şîraniya ziwa, kesme (pelit) pastix sincix ji êmîşin |
| **êqar** | |
| **êrdek** | destkês, dewara ku mirov bi xwe re dibe ji hinekan re, an jê siwar nabe û li pê xwe dikêşe. |
| **êrês** | serekê fillan |
| **êrîş** | ajotina ser, dirêjê kirin, hicûm |
| **êrvist** | dara guvîcê |
| **êsûg** | hesinokê ku terzî bi ser tiliya navçarê têxin û pê derziyê pêşve dajon. |
| **êş** | renc, nexweşî |
| **êşan** | êşihan, êşiyan, êş bîr birin, seh kirin. |
| **êşandin** | êş gîhandinê |
| **êvar** | dema berî roava bi saetekê û piştî roava bi saetekê. |
| **êvarkî** | êvarê, dema êvar dibe |
| **êwergeh** | hêwîrgeh, cihê ku mirovan dehbe ji ber tirsekê davêjine. |
| **êwirîn** | hêwirîn, xwe avêtina cihekî an siha kesekî. |
| **êwirîn (hewirîn)** | li hev civîn, kombûn, li hev şidîn, kevok di şikeftê de li hev hêwirîne an êwirîne. |
| **êxir** | ji hemî qalîş an qeftîşan re tê gotin. êxira dev, êxira xûrcikê |

| | |
|---|---|
| **êxistin** | xistin, bi ketindayîn. min ew di ser xanî de êxist. |
| **êxlî** | bir an heriyê dewarê yekrim, êxliyê hespan, an hêstiran. |
| **êxnî** | celebek kuftikên ku ji savarê çêdikin. |
| **êzîdî** | eyzîdî, xelkê ola eyzîd, warê ola wan çiyayên Şengal u Şêxan in. |
| **êzing** | darên ku ji bo şewatê tên birîn |

# F

| | |
|---|---|
| **faf** | kekej, kesê ku di peyvê de gotinekê pir caran li pey hev dibêje. filanî faf e. |
| **fafî** | faf bûn, kekej peyivîn |
| **fafik** | gelekî faf, pir kekej |
| **fal** | bi nihêrîna fincan an pêşiya yekî peyivîn, li ser nediyarê xeberdan |
| **falçî** | kesê ku falan vêdixe |
| **falî** | di bin polatê tifingê hertejên de kunek heye ku agir dide hundirê tifingê. faliya tifingê hatiye girtin. |
| **falinc** | felc, pûçbûna hinek an tevayiya lebatên mirov |
| **falincî** | kesê ku felc dibe |
| **falq** | demed, destî. falqek mîsk, baq |
| **fanos** | çira ku çar kenarê wê bi dîndoq girtî û ba nikare vemirîne |
| **fason** | celebek caw |
| **fatereşk** | silpezik, telaq |
| **fatoş** | qidîş, komên sapê zad ku li collê didin ser hev |
| **fecar** | bertang, fecir |
| **feda** | fida, dayîna bê berdêl bê hember. ez ji bo welat canê xwe feda dikim. |
| **fedakarî** | kesê ku feda ji xwe re dike kar, dikare her feda bike |
| **fedkirin** | bi hişyarî li tiştekî nihêrîn |
| **fehêt** | şerm, bê kezebî, kêmiya kira xwe bîr birin û bi ber xwe ketin, eyb kirin |
| **fehêtok** | şermok, şermîn |
| **fehl** | çi dewara ji bo tov tê girêdan, hespê fehl gayê fehl |
| **fek** | dev, ji berikê berjêr erzen, çen |
| **fekiyan** | hatin, badana libatekî mirov. destê min fekiya. |
| **felat** | xelasî, ji tengiyê kê derketin. felata me di destê filan de ye. |
| **felek** | çerxa dinê, herçî bûyina derî karîn û daxwaza mirov. felek ji me re bêbext e. |
| **felitandin** | xilaskirin, ji tengiyê derxistin. me ew ji dest neyar felitand. |

| | |
|---|---|
| **felitîn** | xelas bûn, ji tengiyê derketin. ma tu felitîna xwe ji kê dizenî ? |
| **felît** | xortê ku hîn eqilê wî temam ne bûye, berî ku bigihê hejde salî. filan hê felîte gazin lê nabe. |
| **felîte** | bê qas û dûzan, di hev de ketî, ji hev belav, (ji felîtînê) tê |
| **fen** | fend, hîle, xap. filan gelekî fenan dike. |
| **fenaz** | kesê ku fen û xapan ji xwe re dike kar, nebaş |
| **fener** | çira ku li ber derya, an li ser riyan datînin ji bo bîrbirina xeterê |
| **feq** | ew aletê ku pê dehbe û teyran digirin, çi tevdîrek ku tiştekî dide girtin. neyar bi fenazî em xistin feqê. |
| **feqeh** | şagirtê ku ilmê şerîetê dixwîne |
| **feqisandin** | arqilandin, ewiqandin, li derengî xistin |
| **feqisîn** | werqilîn. ewrqîn, bi derengî ketin |
| **feqîr** | belengaz, zîvar |
| **fer** | tek, yek |
| **feraset** | feraset, zanîn û nasîna tiştan û kesan ji ber xwe bêpirsîn. tenê bi nihêrînê |
| **ferat** | çemê mezin ku çaviya wî di Kurdistana Bakur de li Bingolê dertê û piştî ku di Bakurê Suriyê re derbas dibe tevî Dîcle dibe di hinda Besreyê de dikeve deryayê. |
| **ferfûr** | |
| **ferihandin** | tirsandin, veciqandin |
| **Ferihîn** | tirsîn, veciniqîn. Hespê min ferihî. |
| **ferikandin** | bi destan mistdan, bi tiliyan quvaştina tiştekî û hêrifandin |
| **ferikîn** | hatin mistdan, hêrifîn |
| **ferişte** | milkayet, melek |
| **ferk** | ji hev, an ji tengiyekê xelasî. Mehîna min ferk bû û za. |
| **ferman** | daxwaz û enira kesên hikimdar, fermana hakim |
| **fermanber** | kesê ku fermanê bi cîh tîne an digehîne hinekan |
| **fermanberî** | bi cîhanîna fermanê mijûl bûn, ew kar kirin |
| **fermandar** | xudan ferman, serdar, qumandan |
| **fermandarî** | karê fermandar, an bi wî karî rabûn |
| **fermande** | kesê ku emir dide. ma tu fermandeyê me yî ? |
| **ferq** | |

| | |
|---|---|
| **ferş** | kevirê mezin bi şertê ku pehn be, berê aş, ferşê eniye, hestiyê eniyê ê pehn |
| **ferşxane** | depê ku pê zibil ji malan radikin |
| **ferruc** | dîkişk, an farikê sê, çar mehî û berjor heya yek salî |
| **ferx** | çêlik |
| **ferxes** | |
| **ferxik** | çêlikê biçûk |
| **ferzîn** | |
| **fes** | kumê sor ê bi pişkul |
| **fesal** | kês, firset . fesala wî ket me. |
| **fesal** | rewş, kesim. fesala wî gelekî baş e, çi fesalek baş lê ye. |
| **fesalker** | kesê ku cilan dibire, ji bo dirûtinê |
| **feşilandin** | nehiştina pêkanînê |
| **feşilîn** | feşkilîn, pêkneanîn, karek nebirîn serî. ez nikarim vî karî de feşilim. |
| **fetqolî** | qundirî |
| **fetiqandin** | bişkivandin |
| **fetiqîn** | bişkivîn |
| **fetisandin** | bi destan gewriya yekî guvaştin û kûştin, an di nav avê de kuştin [bêderb] mirar kirin |
| **fetisîn** | bê lêdan mirin, mirar bûn |
| **fetîr** | nanê sêlê yê bê hevîrtirş |
| **fetlonek** | tiştê ku li hev tê badan û fitîl lê dikeve |
| **fexir** | dilgirî. filan fexra xwe li ser me dike. |
| **fezûl** | qellac, awan. filan gelekî fezûl e, yanê gelekî fesad e. |
| **fêde** | kar, destkewtin. me tû fêde jê nedît fêde jê nîne. |
| **fêkî** | meywe, wek, sêv, mişmiş, hermê hwd |
| **fêl** | niyet, a ber dil. fêla wî derheqê me de ne baş e. |
| **fêris** | xûrt, jêhatî, mêrxas |
| **fêrûze** | pêrûze, celebek qûmaşê ebirşim |
| **ficik** | |
| **tik** | birîn, xelaskirin. bazara vî xanî ji me re fik bike. |
| **fikar** | endîşe, bi berketin, dan ber hev. di aliyê min ve qet fikaran neke. |

| | |
|---|---|
| **fikirîn** | raman, ji bo bîrbirina rastiyê serê xwe westandin |
| **filan** | bêjeyek welê ye ku şûna navê kesê ne paş digire, filan û bêva n |
| **filleh** | naveke ji mesîhiyan re hatiye danîn |
| **filitandin** | berdan, ji tengiyekê xelas kirin. min ew ji wê belayê filitandin. |
| **filitîn** | hatin berdan, ji tengiyekê xelas bûn. ez ji wê nexweşiyê filitîm. |
| **finazk** | sûc, guneh, bêbavî. ma ez finazkê wî nizanim. |
| **fincik** | hal bûn, xwe avêtin |
| **find** | mûma ku ji şimayê çê dikin, her tiştê biçûk |
| **finûnî** | serbazek di siwariyê de, serokê sed leşkeran |
| **firr** | qultek, gepek, firek av bide wî. fir ji firînê. firek da xwe, bi firê ket. |
| **firandin** | bi banî, an hewa xistin, bi firê xistin |
| **firavîn** | xwarina ku piştî nîvro dixwin. di demjimêr duduyan de me firavîn xwar. |
| **firax** | her tiştê ku xwarin tê de çêdibe û tê de tête xwarin |
| **firaxşo** | kesê ku firaxan dişo |
| **firaxşoyî** | firaxê şûştin |
| **fird** | hûrkirina nan di nava pêxwarinekê de, firdê şîr, firdê mast, firdê avgoşt, firdê şorbe |
| **fireh** | pehn, ne teng |
| **firengî** | nexweşiya ku pir caran, di civîna jin û mêrên biyanî de çar dibe |
| **firêqet** | dil rûniştin, dil rihet bûn. piştî ku me neyar revand ez dikarim firêqet rakevim. |
| **firêze** | pirêze, şûna zadê çinî. |
| **divê** | em îsal firêzeyên xwe bikin werz. |
| **firfat** | cil, an potên peritî bi gincal. wî cilline firfat li xwe kirine. |
| **firidandin** | puf kirin, firdik kirin, firidandina şîr an çay an şorbe |
| **firidîn** | pûf bûn, hatî sarkirin. ev xwarin firidiye, yanê hatiye sar kirin. |
| **firrijîn** | fîrrijîn, dengê ku ji bêvila hespan tê |
| **firikandin** | mistdan. bawî lingên xwe bi zetê difirikînin. |
| **firîk** | genimê şîne, nîvzer li ser guriya êgir dibirêjin dikin savar |
| **irqeirq** | dema ku av di ber mirov de dimîne û deng ji gewriyê tê. |
| **isbat** | xwey, berbiçav |
| **israf** | bêawa serf kirin. |
| **istibdad** | zorkerî |
| **işaret** | niçandin |
| **itaet** | gurê kirin ji gotinê derneketin. |
| **ittiham** | gunehek avêtin ser yekî. |
| **ixbar** | xeber dayîn, wî ez ixbar kirim. |
| **ixbarî** | ixbarî li min da. |
| **ixbarname** | kaxeza ku pê ixbarî tê dayîn. |
| **ixtilas** | bi xap û bêbextî malê xelkê an emanet xwarin. |
| **izin** | destûr |

# Î

| | |
|---|---|
| **îd** | cejn e, vê îdê ezê herim Misrê. |
| **îlan** | eşkere kirin, dan zanîn |
| **îlon** | |
| **îman** | bawerî |
| **în** | dêv, navê rojekê hefte, hingûra dênê roja pêncşemê. |
| **înan** | hîndan. anîn |
| **încar** | îcar, vêcarê |
| **înik** | kuna masiyan |
| **îro** | vê rojê, roja ku em tê de. |
| **îroro** | roja îro |
| **îsal** | sala ku em tê de. |
| **îsere** | awayê parvekirina enbarên zad. |
| **îskink** | bayê ku di sînga mirov de bêhemd bi dertê. îsk têne min, îskinkê min têne. |
| **îsot** | dermanê germ. |
| **îşev** | vê şevê, şeva ku em tê de. |
| **îşlîk** | sixme, kurtikê bê pî. |
| **îşk** | darê ku pê werîs dişidînin. |
| **îwer** | |

# J

| | |
|---|---|
| **jajî** | |
| **jajîron** | |
| **jan** | êş, nexweşiya giran. |
| **jana zirav** | nexweşiya sîngjarî, werem. |
| **jar** | qels, kêmgoşt bê hêl. |
| **jarî** | qelsbûn, kem goştî, bê quwetî. |
| **jarîn** | zarîn, qirîn, feryad. jarîna wî di dinê diçe. |
| **jehr** | axu zihêr. |
| **jehrî** | nexweşiyeke ê ku pê dikeve tim vedirişe, pîvazê pê didin xwarin, rihet dibe. |
| **jeng** | jengar, pasika ku ji memê tê ser tiştên madenî. |
| **jengarî** | tiştê ku jeng digire |
| **jenîk** | hûrê maden wek zere |
| **jendin** | di hev de xistin, kitkitî kirin. zendina pembo an heriyê. |
| **jêbûn** | hatin birîn, jê dûr ketin. |
| **jê bûn** | jê bê par bûn, destê min jê bû. |
| **jêgerîn** | dev jê berdan, têkiliya xwe jê neanîn, jê bigere |
| **jêhatin** | bi kêr hatin. |
| **jêhatî** | bi kêr hatî. |
| **jêkirin** | birîn |
| **jêlî** | jîrkî |
| **jêr** | binhêl, bin ne jor, ew di jêr ve hat, serejêr, berberjêr. |
| **ji berkirin** | bê ku li kitêbê binêre xwendin. min dersa xwe ji ber kir. |
| **ji bîrkirin** | çûna tiştekî ji bîra mirov. ji bîrve kirin. min ew tişt ji bîra kir |
| **jih** | ji tayê ku ji roviyên badayî çê dikin. |
| **ji hev** | ji hev kirin, ji hev girtin |
| **jimartin** | hesab kirin, yek du sê çar li pê hev gotin. |
| **jin bav** | damarî, jina bavê |

| | |
|---|---|
| **jinebî** | jina ku mêrê wê dimire û bê mêr dimîne. |
| **ji xwe kirin** | li ser xwe danîn, min cil ji xwe kirin. |
| **jijû** | heywanekî biçûk û bi sitirî ye, xweş maran digire û dixwe. |
| **jîn** | heyat hebûn |
| **jiyîn** | heyîn, mayîn |
| **jor** | serhêl, hela jorîn, ser bi jor bûn, ber bi jor bûn. |
| **jûm** | dem, wext |
| **jûr** | tiriyê nebuyî û tirş, bi mana tiştê nebûyî û negihêştî jî tê. |
| **jûvan** | |

# K

| | |
|---|---|
| **ka** | pirsiyar. ka ew çû kû? Ka bavê te? ka sapê ceh û genimê hûrkirî ku didin dewêr |
| **kab** | kabên ku pê dilêzin, kabikên mirov û dewar |
| **kabik** | perçên biçûk û çarkoşe ku pê tiştên dep an madenî çê dibin kabikên deriyên sendoqê ên kemberê |
| **kabok** | textikê çakê |
| **kaboş** | bi kok û esil |
| **kabûs** | term, giraniya ku di xungerê de li mirov çê dibe. kabûs hate ser min. |
| **kaçanî** | sehena ji sindoq an ponsilîn |
| **kadane** | celebek hespê mezin |
| **kade** | nanê ku di rûn de sor dikin û hişk dibe |
| **kadiz** | kakeşîn, riya karwên, sitêrkên ku di rûyê ezmên de bi vî navî hatine nasîn |
| **kadin** | cihê ku kayê têxin û tê de vedişêrin |
| **kadînmêş** | mêşdank, paşedîn, cihê ku pêtakên mêşhingivê tê de datinin |
| **kafir** | bê bawerî, xwedê nenas, bi mana dilhişkiyê jî tê. Filan kefireki mêran e. |
| **kafûr** | celebek maden jê tizbî û tiştan çê dikin |
| **kaîn** | kayîn, kayikên ku hêstir û ga dikin. Mih dikeyêne. |
| **kaj** | giloka derî. Zînê çar kaj hene. |
| **kaka** | di zimanê zarokan de hêk û hemî tiştê girover nemaze meywe |
| **kakeşîn** | kadiz, riya karwên, tora ezmên, sitêrkên ku bi van navan hatine nasîn |
| **kakil** | navika gûz û behîvan, kakilê gûzan, kakilê behîvan |
| **kakiroskî** | nan an meyweyê ku pir hişk dibe û ji hişkbûnê dişkê |
| **kakûç** | çakûç |
| **kal** | meyweyê nebûyî ev zebeş î kal e, kalik. |
| **kal** | mirovê pir kalik |

| | |
|---|---|
| **kalan** | cihê ku şilfê şûr têxinê, kalanê şûr |
| **kalanî** | kêra bi kalan |
| **kalik** | pêlava ku ji çermê nedebaxkirî çêdikin, çarûxa çerrnînl |
| **kalîn** | dengê bizinê û karê, bizin li karê dikale |
| **kalîmast** | zadê ku li ser bêderê li belengazan belav dikin |
| **kalûme** | şûrê qirêjî yê kalan şikestî |
| **kamaş** | hûrê titûnê ku nabe sigare û bi qelûnê dikêşin |
| **kamar** | qasnaxê bêjing û defik û elegê |
| **kamav** | ava ku di coyê de dimîne û naherike |
| **kamax** | navteng, qalçe, çiya mirov çi ya dewêr |
| **kambax** | xopan bûyî wêran bûyî, alos bûyî, vê kambaxê li vir rake. |
| **kamûx** | ê ku tirî digwêşe û şîrê bi derdixe |
| **kan** | cih, jêder, xwedê kana keremê ye, filan kana eqil e. |
| **kanc** | mirovê zirt bêvac hişk, nepijî, filan peyekî kanc e. |
| **kandew** | çêleka ku avis nabe û pirtirî sal û nîvekê şîr dide |
| **kanî** | çaviya avê ku diherike, kaniya çavan |
| **kanî** | li kû ye? |
| **kankerik** | cihê ku serê hestiyê arçûmekê digehe cînîgê |
| **kapan** | riya teng |
| **kapol** | kahurka ku ax û qirêj tevlê dibe |
| **kapox** | kesê ku giya dike gurz û dipêçe |
| **kar** | kehr, çêlikê bizinê karik, karê virnî |
| **kar** | xebat, kar, dikirîn û firotinê de tiştê ku ji mirov re bi ser dikeve. Di vê bazarê de kara min hebû. |
| **Kar bûn** | xwe pêkanîn me xwe ji çûnê re kar kir |
| **karak** | madenê hesin an cihê ku hesin jê dertê, kana hesin |
| **karaşîna** | karnas, çeknas |
| **karbar** | kar û bar, pêkhatî |
| **karekew** | kesê ku nêçîra ke wan dike karê xwe |
| **karêç** | milêwa ku pê bênderê bi badikin |
| **karêz** | cokên bin erd ji bo ava qirêj |
| **karî** | celebek pincar |

| | |
|---|---|
| **karîn** | pêkanîn, jê hatin, Ez pê dikarim |
| **karivan** | şivanê karan |
| **karît** | warit |
| **karkerrik** | kirtikê guh |
| **karmax** | bêjingê mezin serad |
| **karoş** | giyakî bên xweş e tê xin xwarinê |
| **kart** | bi zaravayê bêrtî, çarîk, ji çaran yek |
| **kartan** | di çîrokan de hatiye dîtin, serdar, fermandar |
| **kartik** | kenik, tertegên ku li serê keçelan çê dibin |
| **kartîk** | êge, mebred |
| **kartimok** | celebek gulên zer |
| **kartol** | bin erd, patata |
| **kar û bar** | xwe pêkanîn, me ji bo rê kar û barê xwe kir |
| **karûş** | giyake wek belkên titûnê ye |
| **karwan** | hevaliya gelek mirov tevî dewarên xwe li çûnekê rêyekê, asmancekê, karwanê me dê sibê bi rêkeve |
| **karwankûj** | jopîter nave stêrkekê |
| **karwanqiran** | Mesîx, navê sitêrkekê, havînê berî sibehê û zivistanê di nîvê şevê de hiltê |
| **karwanvanî** | kesê ku bi karwên re diçe, yek an jî hinek xelkên karwên, karwanvaniyên hîn veneqrîne. |
| **kas** | tasa avê a dîndoqî |
| **kasik** | kasa biçûk a çayê |
| **kasok** | dasa daran |
| **kaş** | pesarên bi hevraz, kaşkirin, tarkirin, li pê xwe di erdê re kişandin |
| **kaşo** | çoganê ku pê holî dileyzin. şakal |
| **kat** | sitiranên dînî, şîretên dînî, katek ji kitêba zendavesta, |
| **kat** | tilayên ku li ser koka dara berî şîn dibin |
| **katar** | goştê ser ê bi serê dîk ve. katarê dîk |
| **katik** | tilayên biçûk xilfên ku li ser koka darê radibin |
| **katûfk** | qufa mezin ku pê tirî dibin ser kergê |

| | |
|---|---|
| **kav** | roja 25ê tebaxê ku hemî meyweyên havînî digehên |
| **kavil** | çerm, post, me miya xwe serjê kir û kaviland. |
| **kavilnişîn** | kesê ku li ser kavil rûdine |
| **kavişkî** | vaca yê virnî çi tiştê berî demê tê dinê û xurt dibe, hillî. Ev berx kavişkî ye. |
| **kavar** | tevayiya sî. çil gundî, ji êrdim biçûktir |
| **kavirr** | berxê du salî, piştî ku salekê temam dike dibe kavir |
| **kaw** | xwedîtî, dilgir |
| **kawîr** | navê giyakî |
| **kawît** | peloka ku ji mot û ardê qewirandî çê dikin |
| **kax** | hilçîna giyayên nebaş di nav çandiniyê da, kaxa pembo |
| **kaxez** | ew tiştê ku ji sap, ka û paç çêdibe û li ser nivisandin dikin |
| **kayîn** | kayik, kain, k=yîna gan a pez |
| **kebanî** | kevanî, kebanî, bermalî, jina ku rêya malê digerîne. Filanê kebaniyek baş e. |
| **kebîn** | kabîn, girêka zewacê, nîkah |
| **kebs** | êşa zik. Kebs hate min. |
| **keç** | kîj, dot. Keç ji kuran dilovatir in. |
| **keç** | ew tişta biçûkê ku ji sergo peyda dibe û di axuran de pir tête dîtin, kêç xewrevîn e. |
| **keçeban** | keça pirr jêhatî, bi çi awayî dibe |
| **keçel** | nexweşiyeke ku li serê mirov dertê, por diweşe û serî kenik digire |
| **keçelî** | keçel bûn |
| **keçeza** | nevî di aliyê keçê ve |
| **keçik** | keça biçûk, an ew keç. Keçik dê bihata yanê ew keça xuya |
| **keçikanî** | di guleşê de ketinek heye ku her du li ser kêlekê dikevin ji wê ketinê re keçikanî dibêjin. Ew çûn hev lê em keçikanî ketin. |
| **keçîlok** | keça ciwan, ber zewac, nûgihaştî |
| **keço** | keçê, pitê, kurd bi vî navî qazî jinên xwe dikin |
| **keçûn** | wek keçan, ne wek lawan, mistkeçûn, sincî keç |
| **ked** | kara destê mirov. Filan ez ji keda min bêpar hiştin. |

| | |
|---|---|
| **kede** | kurê biçûk, ji zarokê bê xwedî re jî tê gotin |
| **keder** | bi ber xwe ketin, dilê xwe êşandin, meraq kirin |
| **kedî** | aş, ne kovî. Pez û dewar ji heywanên kedî ne, mirîsk û kevok ji firindeyên kedî ne. |
| **kedûn** | nîvcer. şerbik, kûp, zad, kûs, ji bo rûn, den, ji bo avê, sewîl, tasik, xirafok, kivî, ji bo mat. mesken ji bo kêşk û çurtan. |
| **kedxuda** | |
| **kedker** | jêhatî, xebatkar |
| **kef** | bilqikên ku bi ser avê an sabûnê dikevin; kefa avê, kefa sabûnê, kefa şîr, kefa qehwê, kefa dest, lep |
| **kufandin** | piştî şêlandinê wergerandin û dirûn, kuf û şêl |
| **kefçî** | kefçik ji dar an ji maden çê dibe ji bo xwarin xwarinê, kefçiyê şorbê |
| **kefçîdank** | cihê ku ji bo veçartin an têxistina kefçiyan çê dikin |
| **kefdan** | kev pê ketin. Ev sabûn xweş kef dide. |
| **kefen** | qerger, cawê ku li cendekê miriyan dipêçin |
| **kefgîr** | kefçikê pehn û vêl kunkunîsk ku pê kefê di ser xwarinê re digirin |
| **kefî** | serpêça ku didin dor, an dibin egalê de didin serê xwe |
| **kefîl** | kesê ku xwe dide ber deyn, an gotin an kirina mirov. Destê xweyî deyn di gewriya kefil de ye |
| **kefik** | aletê ku kurtanker pê kurtanan didirûn, şûjin pê tê ajotin |
| **kefkefok** | |
| **kefkev** | kefsabûna tîr |
| **kefşêv** | firaqa kûsinî û vêl û dev fireh |
| **kefşil** | ava ku di xewê de ji devê mirov tê |
| **keftar** | heftar, eftar, heftiyar, dehbeyekî dirinde ye goştê miriyan dixwe |
| **kefxwê** | mezinê gund, kehy, mixtar |
| **kej** | sorê reng hinne. porê delalê kej e. |
| **kehriban** | madeneke reş û şerê wê heye, jin libên wê têxin sitoyê xwe û jê tizbî û darikê cigaran çê dikin |
| **kekej** | kesê ku nikare dirist bipeyive û li ber gotinê dimîne |
| **kelax** | dewara jar, weza |

| | |
|---|---|
| **kel** | ji ber piraniya germa agir bi kel ketina avê, an şîr an çi tiştê din, bi kel ket, kel kela bevînê |
| **kel** | gayê sitûr û hêc, bila ez kelê rojekê bin, neçêleka salekê |
| **kel** | yek kêl ji kelên dirûnê, dirûtinê. Ca kelekê li kirasê min xe. |
| **kellac** | gellac, avan, fesad |
| **kelandin** | kelijandin, bi kel xistin, pehtin, bikelîne, bikelijîn e |
| **kelaş** | cendekê dewarê nekavilandî |
| **kelaştin** | qelaştin du perçe kirin, vî derî bikêleşe. |
| **kelbedan** | ew aletê ku pê mixan di kişînin |
| **kele** | xwarina kêm xwê |
| **kelebest** | erdê di navbera du çeman de, hewînq, girav |
| **kelef** | hinek desî |
| **keleh** | kelat, asegeh |
| **kelek** | petîxê zer qawin, kelek, meşkebesta ku di ser avên çeman re pê derbaz dibin, |
| **kelek** | miriyê ku raser avê dikeve |
| **kelem** | pijikên ku li ser koka dara birî radibin devî |
| **kelem** | sahne |
| **kelmî** | celebek titûna pîsik |
| **kelendîn** | |
| **kelendo** | dara palê a destî dirêj, tirpan |
| **kelepaçe** | xwarina ser û pê û ûr ku çê dikin |
| **keleş** | zorker, xurt, ji merên xurt û jinên pir çeleng re tête gotin |
| **kelik** | qufik, selik |
| **kelişte** | ji ber siwabûnê qeftîşên ku di erdê de çê dibin |
| **kelî** | pehtî, xaqî tê nema n. şîv keli |
| **kelî** | xwarina kêmxwê |
| **kelîn** | keliyan, hatin kelandin |
| **kelîlan** | germayî. kelîlana nexweşê ne gihaye çilî. |
| **kelogirî** | kelgirî, kela girî, berî girînê heyecana ku ji deng û rûyê mirov dixewine |
| **keloşk** | quçên tehtinî di serê çiyan de |

| | |
|---|---|
| **kelp** | kepeka ku di nav porê mirov de çê dibe. Serê min bi kelp e. |
| **kelpitandin** | bi serve anîn. Filan ruyê min bi nînokan kelpitand. |
| **kelpitîn** | bi serve hatin, çermê min li ber tavê kelpitî. |
| **kelpîç** | kerpîç ji ax û kayê celbê dikin û bi qalib dibirin ji bo avahiya |
| **kel û şo** | şûştina cilan di gel kelê |
| **kelwaz** | serma hişk, îro kelwazek xurt heye. |
| **kelxwê** | dema pir westînê pir xwêdan, hindî ez westîm, min kelxwê da. |
| **kem** | çi tiştê guhbirî kerê kem, hespê kem, beranê kem. Kur: di zikmakî de guh kin. kavirê kur |
| **kemaç** | bê edeb |
| **kemax** | goştê kulêmekan |
| **kember** | ji zîv, zêr û qimaş çê dikin û jin didin pişta xwe |
| **kembersk** | celebek pincar |
| **kemçe kirin** | nîşanî kirina pezê mêşînî bi birîna heriyê ji alîkî |
| **kemik** | kevnik, destmala ku pê ser çavên xwe ziwa dikin |
| **kemîn** | ji bo girtin an kuştina kesekî di pêş kesî de veşirîn |
| **kemr** | êrdim, erdekî bi sînorên xwe xuya. Li kemra cizirê baran nehatiye. |
| **ken** | kêxweşiya xwe bi dengê ha, ha, ha, dan xweya kirin. Wî em kenandin, ew bi me keni. |
| **kenandin** | kenê yê anîn. Me ew kenand. |
| **kendal** | tehtên ku bin wan tê kolan û helek vala dibe, ji vê valahiyê re kendal tê gotin |
| **kenêr** | navê dareke bê ber e, bêhna wê xweş û darê wê xurt e |
| **kengê** | çi gavê. Ma kengê ez çûbûm wê derê. |
| **kenîn** | ken kirin, kenîn. Filan ji min re xweş nehat. |
| **kenîşt** | şîlpoqên ku bi çavên mirov dikevin. Çavên wî kenîst girtine. |
| **kepek** | kopik, kilopik. papik, di bêtina ard de qaşikên zad ku bi ser bêjingê dikevin |
| **kepelek** | kurmê ku dikeve nêjuyê pez û dikuje |
| **kepelekî** | peza ku bi nexweşiya kepelek dikeve |
| **kepen** | kepenek, kulavê ku şivan li xwe dikin, piştî baranê kepenek |
| **kepiçandin** | gepiçandin, rahêjandin û dehf dan. Wî xwe gîhandê û kepçek dayê gemşek dayê. |

| | |
|---|---|
| **kepiçîn** | hatin rahêjandin û dehfdan |
| **kepir** | erdê rast ku axa wî nerm, ne qirac |
| **kepirr** | holikên ku ji hejikan çê dikin |
| **kepîlev** | tevayiya difn û lêvan |
| **kepo** | kepû, kepî, poz, serkepî, serê poz, bêvil :firmikên poz |
| **ker** | dewarek yeksime bi kêrî baran û siwarbûnê tê |
| **ker** | perçe, kerî |
| **kerr** | kesê ku nabihîse, ji bihîstina deng û pêjnan bêpar |
| **kerrafî** | xwarina bêfesal û bê edeb û kirêt. xwarina filan kerrefî ye yanê kirêt e. |
| **kerran** | zontê ku pê keviran dişkênin. kerran, civaneya ker |
| **kerrane** | xurt û mezinê her tiştî. Filan kerrsnekî mêran e, mareki kerrane bi wî ve da. |
| **kerrax** | kesê ku di çandina pirincê de şareza |
| **kerrax** | rast û qirêja ku di kelandinê de bi ser xwarinê dikeve an dadine binî kerraxa mat kerraxa qehwê |
| **kerb** | xeyd, rik |
| **kerbeş** | giyakî bi sitiriyê ker gelekî hez jê dike |
| **kerrekerr** | di bin ve bê deng. ji ker ve ez çûme, ew kerrekerr hate min. |
| **kerbok** | kesê xeydok bi kerb kerexane |
| **kerxane** | |
| **kerxane** | cihê ku maden jê dertêxin |
| **kerçilandin** | tevî hev kirin, li hev xistin. Filan tiştê min kerçiiandiye. |
| **kereh** | erdê bi kevir ku tê de rêçûn dijwar e |
| **kerehû** | bayê ku havînê xurt tê |
| **kerem** | comerdî |
| **kereng** | pincarekî gelekî xweş e. ji kereng pirsîn gotin, cihê te li kû ye?Got ba dizane. |
| **kerepol** | malê ku xwedî nikare ji destên xelkê biparêze |
| **kerrevan** | merxasê ku çavên xwe ji çapan naparêze |
| **keribandin** | xeyidandin kul û êş xistin dil |
| **keribin** | xeyidîn |

| | |
|---|---|
| **kerrifîn** | bêfesal û kirêt xwarin. De were vê jehrê bikerrifîne. |
| **kerrik** | tekle, pestek, celebek eleke bi ser şapik de li xwe dikin |
| **kerik** | di haletê cot de perçeyek |
| **kerritandin** | bi diranan kirr kirr kirin û xwarin. wek mişkan dikerritîne. |
| **kerrixîn** | şemitîn |
| **kerî** | perçe, vî zebeşî kerî ke. kerî, keriyê pez |
| **kerge** | cihê ku tê de tirî digvêşin û şîrê dertêxin |
| **kergîd** | kirkut, hesinê diranşeh ku pê tevnê çê dikin |
| **kermeh** | kermeg, parçê sergînan ê çalê hişk |
| **kermêş** | kelmêş, pêsî. vizik, kelmêş |
| **kermişandin** | qirêj kirin. Wan firaqan mekermişine. |
| **kermişîn** | qirêj bûn, çavên kermişî |
| **kerqulan** | kerê hov, berî berfa şên 1909 ev heywan li berriya Mêrdînê peyda dibin, lê sala berfa şêv tev de mirin |
| **kerosik** | |
| **kerpîç** | ji celbê bi qalib çê dibe û pê xanî çê dibin, hacûr, kerpînc |
| **kerrrane** | di her tiştî de pir xurt û serdest, kerranekî dewlemendane, kerranekî mêrane, kerranekî dizane. |
| **kersax** | di saxa çeman de erdê ku bi kêrî çandiniyê nayê |
| **kert** | ged, di daran hesinekê de ged an birîna ku tête çê kirin. kert bi kert, ged bi ged |
| **kertek** | ji her tiştî pirranî |
| **kertik** | yek kert, ew kert, kertik, keskayiyeke pelkên wê gewr e, pirrtiri niv gazê bilind dibe, ji bo xwarina zivistanê hişk dikin |
| **kerx** | kût, ko, kêra min kerx bû, |
| **kerx** | pir pir, filanê man kir kerx yanê pir zêde kir. |
| **kes** | hin, mirov kesek nehat, kes neçû. |
| **kesad** | heywanê wesa jar |
| **kesax** | şax, tilayê darê an reş birin, kesaxa rezan |
| **kesb** | qubika serşokê, kesba serşokê |
| **keser** | bi dilêşî bêhna xwe berdan, hersîng, li lan keserên kûr dikêşe |
| **kesib** | hej û pijên ku av bi xwe re tîne |

| | |
|---|---|
| **kesidandin** | xwê kirin, penîrê te kesidi, yanê şoravka xwe girt. |
| **kesixandin** | ser û guhê tiştekî birîn, bê ser û guh hêlan |
| **kesk** | rengê giya |
| **keskayî** | hemî sebzeyê ku bi heşinayî tête xwarin |
| **keskesor** | qozeqer, bûka baranê biharê, di barîna baranê de li rûyê ezmên xuya dike |
| **kesper** | kesê ku çavên wî keskê vekirî be |
| **kespik** | kurmekî kesk e, bi kullî dimîne lê jê dirêjtir û bilindtir e |
| **keserewan** | celebek şarê bi sirme, şara keserewan |
| **keş** | di avêti na nîşanê de rast an çep lêdan. Berîke wî keş çû, yanê an rast, an çep çû, lê neket û ser û bin jî neçû. |
| **keşe** | seydayê ola mesîhiyan, sêberê din |
| **keşetî** | karê keşe kirin |
| **keşk** | savarê di şîr û mast de distirên û hişk dikin, zivistanê dikin şorbe |
| **keşkîn** | şorba ku ji keşkê çê dikin |
| **keşkul** | firaqa ku derwêş xwarina xwe tê de dicivînin |
| **keşol** | celebek beqlê çolê |
| **ket** | ji cihekî ketin, di jor de ket, ket jêr, ket yonce, celebek nefel têtê çandin |
| **ketin** | ji cîkî ketin. Ketina filan dijwar bû. Li ber ketin, bi ber ketin, bi reş ketin. hêv bi reş ket, piştî bîst û duduyê mehê, li hev ketin, bi hewa ketin, des bi ser de ketin. |
| **ketew** | babetek nexweşiya ji hespan û hêstiran çê dibe |
| **kevan** | kevanê ku pê tîr davêtin, tîr û kevan: kevanê ku pê herî û pembo dijênin, kevanjenê kevan dijend. |
| **kevandin** | tewandin, xwehr kirin, filan hesin dikevêne. |
| **kevane** | her tiştê wek kevan renge hîv, tewandî, çaviya pirekê, qentir wek yek kevane ne. |
| **kevanjen** | libûdî, yê ku kevan dijene |
| **kevanok** | kevanê biçûk |
| **kever** | bizina ne reş, ne gewr, ne sar, ne şîn, di nava van rengan de rengek |
| **kevin** | terhî, laçik, kitana jinan a gewr. Kevina jina te li serê te be. |

| | |
|---|---|
| **kevir** | kuç zinar, ber, teht, lat, ferş, şîjik, pîjik, tîjik, xerxule, pûrre ku diherife, petat, kevirê kewrê nerm |
| **kevirkanî** | berhanîk, kefkanî, ji tayê mû diwînin û pê keviran tavêjin |
| **kevirqulibtî** | kesê ku li ser rê û ramanekê namîne, rojê di rêyekê de û bi ramanekê |
| **kevî** | tiştekî pehn çarmedarên wê keviyê, keviya cillê, keviya siniyê, kaviya tasê, kevî, berfa ku heya havînê li ber royê dimîne |
| **kevîlok** | firaqa ku ji axê çê dibe û tê de rûn an hinguv vedişêrin |
| **kevn** | ne nuh, ji mêj cilên wî kevin bûne. |
| **kevnar** | çi tiştê pir kevn dibe. Ev dar kevnar e. |
| **kevnedar** | dara ku pir kevn dibe û hin jê hişk dibe, an dirize |
| **kevnejin** | jina navsal ku her tiştî dizane û bîr dibe |
| **kevnekun** | kuna kevn, ku ji mêj ve heye |
| **kevok** | kevot, kewê şîn, teyreke kedî dibe, di malan de xwedî dikin, goştê wan xweş e |
| **kevokurk** | qumrî, teyreke di xaniyên bajaran de dijî, nîv kedî ye |
| **kevtik** | pêçe, destmala ku jin bi ser çavên xwe de dikin |
| **kefz** | kevz, kez, kevzik, kevzên, kefa şîna ku bi ser avê dikeve, bêhêvî dest davêjin kefsê kevzê. |
| **kew** | kewê gozel, kewê çîr. kewê sûsik, şahkew, mêkew, marî |
| **kew** | şewata ku bi hesinê sorkirî li mirovan dewêr dikin |
| **kewandin** | kew kirin |
| **kewaşe** | hej û çiloyê ku datînin ser darê assaqan ji bo neweşêna axê |
| **kewar** | pêtîkên ku ji heriyê çêdikin, ji bo zad, ji bo mêş hingivan |
| **kewden** | gêj û bê mêjû ehmeq |
| **kewj** | xeyd, qehr, min kewja xwe jê derxist. |
| **kewjandin** | xeyidandin, qehirandin, dilêşandin |
| | kewijîn xeyidîn, qehirîn, dilêşbûn |
| **kewt** | kesê kal û diran ketî, filan kewt bûye. |
| **kewitîn** | bi pîsî mirin filan kewitî. |
| **kewî** | cihê birînê, cihê kewê |
| **kewkender** | teyrekî mezin û reng zer |
| **kewkurt** | kufrêt, kirkût, kibrîta zer û genimî |

| | |
|---|---|
| **kewn** | di demê de, ev tişt di kewna xwe de ye, benga wî ye. |
| **kewsel** | reqa bej, wek kêso |
| **kewtekewt** | rejîn, kewtina seg bê rawestan |
| **kexme** | celebek cawê ebirşîm, jinan xuftan û heval kiras jê çê dikirin |
| **keya** | kehya, kêfxwê, mixtar, pêşiya gund |
| **keyandin** | çelqandina tiştekî bi rêzan, weka keyana dewme, dewê xwe keyand em dêewdikên. |
| **keyar** | tiştê ku çêkirina wê dirûst û saxlem. Ev caw keyar e. |
| **keybir** | şûrê bi hundur ve badayî |
| **keyf** | kêf, şayî, xweşî, me keyfekî baş kir. |
| **keyfer** | berdêlk, di ber ve |
| **keyferat** | li ber xwedan xîret nêdal |
| **kezaxtin** | birîna tilayên daran û şivê rezan birîna ji bo xurtkirinê ne di kok ve |
| **kezeb** | ceger, cerg, kezeba reş |
| **kezixandin** | kezaxtin |
| **kezî** | guliyê porê jinan. Bedewa kezî mor, keziya sito, reha sitûr a di paş sito de |
| **kezîr** | kizîr, berdestiyê kefxweşan mixtar, peyayê ku bi xizmeta gund radibe |
| **kê** | pirsîn. kê got, kê an, kî dit, ya kê ye? |
| **kêl** | kevirê ku di ber serê miriyan de dadiçikînin, kêla gora wî |
| **kêl** | qasek ji zad, 16 teneke |
| **kêlan** | kêran, beştê gelek sitûr û dirêj, hêran. |
| **kêlan** | ajotina erdê bi gîsin, ser û bin kirina axê. Me erdê xwe kêlan kir. |
| **kêlek** | tenişt. kêleka rastê, kêleka çepê |
| **kêlendî** | kêlendî, tirpan, dasa palê ya mezin û destî dirêj |
| **kêlî** | dem, çax, ez vê kêliyê çûm. |
| **kêm** | qirêjiya ku bi devê birînan dikeve, reng zer nêm. Birine min kêm girtiye. |
| **kêmanî** | kêmasî, kirên kêm, bê kêr, bi şûn de man. Di vî tiştî de me kemanî ne kir. |
| **kêr** | fêde, ev tifing bi kêr nayê. Filan peya bi kêr e. |
| **kêr** | kêrik, pê dewar serjê dikin meywe, werz û sebze hûr dikin |

| | |
|---|---|
| **kêrik** | kêra biçûk, ya ku devên wê berîkan de tê hilgirtin |
| **kêrî** | darê ku têxin navbera lolepên meşka dêw. Kêrî: pişt, kêriya çiyê, kêriya masî |
| **kêsim** | rewşa mirov, kêsima filan xweş e. |
| **kês** | keys, taw, fersend. kêsa wî ket min min kês lê enî, min kês jê bir. |
| **kêsme** | dayina xwe ya ku axê ji eşîrê distand |
| **kêste** | perçê axê ku ji ber qîsin an tevir radibe |
| **kêşandin** | kêşan, bar kirin, li pê xwe kişand. |
| **kêşi** | koma êzingan |
| **kêvjal** | heywanekî avî û biçûk e, li ser her du kêlekan bi rê diçe |
| **kêvroşk** | kerguh, heywanekî beza û gûhdirêj e, bi şev dişêre û bi roj radizê |
| **kêzên** | lûlikên avê yên stûr ku pê avê di bin erdê re dibin |
| **kêz** | celebek mozên reş, ji pî sikê hez dike, keza gû |
| **kêzik** | kêşa biçûk |
| **kêzim** | |
| **kêzîn** | ji bo herîkina avê kunên ku di dîwarê hewşê de çê dikin |
| **kiçêç** | cihê ku mirîşk dikolin û xwe tê vedigerînin. |
| **kiçûle** | gûrzên kêndirê ku tê xin avê |
| **kidarik** | kuvarik |
| **kifş** | xuya. ber bi çav |
| **kijik** | seleme. hillûcik, zarok ta lê dipêçin û davêjin erdê û digerin |
| **kijûre** | navbera arzaqan |
| **kijûrek** | kijûle, çîlo û hejikên ku têxin arzaqan ser beşt û maxan |
| **kil** | dermanê reş yê ku jin têxin çavên xwe. çavên bi kil jan dane dil. |
| **kill** | dehfaxurt, min killek dayê. |
| **kilb** | singê sitûr û dirêj |
| **kilçan** | fanosa biçûk |
| **kildar** | kilcîv, kilçov. darê ku pê kilê têxin çavên xwe |
| **kilît** | kilîl, pê derî ve dibe û tê girtin |
| **kilîsibhan** | celebek kila baştir |
| **kilor** | nanê ku şîr, rûn, hêkan û şekir têxin hevîrê wî û dergirmî û sitûr çêdikin |

| | |
|---|---|
| **kilorî** | nanê ku wek kilorê lêdixin |
| **kiloz** | kûzikên dindoqî |
| **kilox** | hestiyê serê mirov. Bi serê dewar re jî tête gotin. Serê wî wek kilorê kerî. |
| **kils** | kevirên ku di kûrikê de dişewitînin, kirêç |
| **kilsîn** | giya kî çiyan |
| **kimkim** | piranî, gurraniya çû tiştî dibe. Niha kimkima zebeşan e. |
| **kin** | kurt, kin bûn, kin kirin, kin birîn |
| **kinar** | kevî, çar kinar |
| **kinc** | tosp, cilên binî, kiras û derpê û qutik û sixme. roja kincan berî cejnê bi rojekê. |
| **kincirr** | kincên ku diçirin û zîtirên wan di erdê re diçin an pêde li ba dibin. |
| **kinîşt** | pilîşk, şîlpoqên çavan, filan çav bi kinişt e. |
| **kinişte** | kinîsa cihûyan |
| **kinf** | |
| **kinoşkirin** | maştin, malan |
| **kinoşe** | sivmik gezik miştek |
| **kinûs** | çikas, çilûs pexîl |
| **kir** | ya ku mirov dike .Ev kira filan e, an kirina wî ye. |
| **kirr** | sirt û girên ku ji lat û ziwaran û tehtan bi hev ketiye, kirê tendûrekê |
| **kirab** | kiraw, erdê ku qîsnek lê dikeve, carekê tê ajotin. Bi du car ajotin dibe şîv. |
| **kirandin** | bi dirana di xwarinê de kirt kirt kirin. Filan nanê hişk dikirine. |
| **kiras** | kincê ku mirov di bin cilan de li xwe dike |
| **kire** | kesê ku dike. Filan kireyê vê yekê ye. |
| **kirê** | ji bo demekî xuya bi peran dana tiştekî. Min xaniyê xwe kirê kir. |
| **kirêç** | firaqên ku ji axê çêdikin ên renga reng xesif |
| **kirêdar** | kesê ku tiştekî kirê dike |
| **kirêt** | nexweş, pîs |
| **kirijandin** | rûyê yekî ber ken kirin |
| **kirrijîn** | rûyê xwe bi ken nîşandan |

| | |
|---|---|
| **kirrikandin** | kirt kirt bi diranan şikandin û xwatin |
| **kirin** | mêr kirin, jin kirin, bar kirin, kar kirin, sor kirin, şor kirin |
| **kiriyar** | kesê ku ji rojname an kovarekê re abone dibe |
| **kiriyarî** | ji rojname an kovareki re abone bûn |
| **kirrîn** | bi hayê tiştekî dan û sitandin |
| **kirîv** | kesê mirov kurê xwe di pêşa wî de sinet bike |
| **kirîvanî** | kurên xwe di pêsa hev de sinet kirin |
| **kirrkirrik** | kirtikê guh |
| **kirmikiz** | nexweşiya ku ji ber kurên zik ji mirov çê dibe |
| **kirmî** | kirmoyî, tiştê dirêjkirî |
| **kirnas** | kirnaç, kesê rê bi xurî |
| **kirnizî** | kevn, kot, bê ser û guh |
| **kirnî** | |
| **kirt** | deng, kirt kirta diranan |
| **kirtan** | camûsê xedsandî. kirtan kirin, xesandin |
| **kirtek** | berfa ku li ber baran û royê hişk dibe kirt kirt jê tê |
| **kirtik** | kirkirika guh |
| **Kirt mirt** | hûr û pûr |
| **kirtnak** | |
| **kirtûpan** | beredayî, perakende, hemî kirên filan kirtûpan e. |
| **kirûr** | jimara 500000, nîv milyon |
| **kirûz** | |
| **kiskizîn** | bi tûnge tûng giliyê xwe kirin |
| **kişandin** | tar kirin, berve xwe şidandin |
| **kiş kiş** | ji bo qewitandina mirîşkan tê gotin |
| **kişkişandin** | di erdê re kişandin û vebûn, rakişkişandin |
| **kişwer** | welat, êrdim |
| **kit** | tek, yek, kitek, du kit kit bi kit |
| **kitan** | havika gewr ku jin bi serê xwe de dikin |
| **kitav** | kuncî |
| **kite** | deng li pisîkê kirin, kite kite |

| | |
|---|---|
| **kitêb** | rûpelên nivîsandi li ber hev ji bo xwendinê, kitêba min. |
| **kitrimî** | bi piranî, piranî kitrînî xelkê bajaran me dilçak in |
| **kitût** | nanê ku kevn dibe. Nanê me kitît bûye. |
| **kivî** | havinê penîr, kivî, dennê avê ku devê wî teng e |
| **kix** | bi zimanê zarokan qirêj, revîn |
| **kixse** | pîvaza biçûk ku ji tov çar dibe û tê çandin dibe pîvaz |
| **kiyarik** | celebek giya |
| **kiz** | bînteng. Filanê ez kiz kirim. |
| **kizbelok** | girzik, şeng, giyake tête xwarin |
| **kizêre** | tûre giyake pê zikê mirov dimeşe |
| **kizêrî** | dema kozê agir vedimire û reş dibe |
| **kizik** | çizêrik, davê pez hûr dikin û dihelinin û perçên sor dibin. Me şorbe bi kizikan kiriye. |
| **kizin** | celêbek zad e ji bo xwarina ga û çêlekan tê çandin |
| **kizirandin** | pizirandin, şewitandina tiştekî ji mû an heriyê |
| **kizirîn** | pizirîn, şewitîna tiştekî ji mû an rîs. Şalê min kizirî. |
| **kizî** | şitlên ku ji koka darên birî hildikevin. |
| **kizî** | bende kolî |
| **kiznik** | di bêjingkirina genim de tiştê ku bi ser bêjingê dikeve, seriyê genim ên hûr nebûyî tevî sap û qirş û giya |
| **kizok** | kesê her car û ji bo her tiştî xwe kiz dike |
| **kizûrî** | bihna ku ji şewata hirî an mû tê |
| **kizwan** | ji dara beniştokê berek dibe di navbera mengûş û fistiqan de, jê sabûnê çê dikin û dixwin, tama wê wek fistiq e |
| **kizwet** | bi xiza, bi qîmet. Ev xwarin bi kizwet e. |
| **kî** | pirs. Kî hat? Kî çû? Ew kî ye? |
| **kîloz** | kûzikê dindoqî. qetremîz |
| **kîn** | rik |
| **kîndar** | bi rik |
| **kîndarî** | bi rik bûn |
| **kîp** | goreyî wî an wê. Ev sol ji lingê min re kîp e. |
| **kîpe** | bimbarê dagirtî |

| | |
|---|---|
| **kîpik** | tencerê kûzik ku ji axê çê dikin |
| **kîr** | qamûş, mizî, xirr |
| **kîrakî** | bajar, cihê ku tişt jê tê firotin |
| **kîrçilês** | kîrçilek, kesê ku çi dibîne dixwaze têne |
| **kîrêşk** | kinîst, kîl. şîlpoqên çavan |
| **kîrqot** | |
| **kîs** | tûr çiwalê biçûk. |
| **kîs** | tûrikê reş ê biçûk di serşokan de xwe pê dişon |
| **kîsik** | tûrê biçûk, kisîkê mêjû, perdeya tenik a li ser mêjû kîsikê mîzê: tûrikê ku tê de mîz digehê hev |
| **kîso** | kûsî, li ser pişta wî qasikek heye, dema ditirse serê xwe têxe nav wî qaşikî |
| **kîsofîs** | celebek giya ye di nav rezan de şîn dibe |
| **kîş** | berkîs |
| **kîv** | qure, peşk me kîv kişand |
| **kîzên** | herqa bin erd ku ji bo qirêja avrêjan tête çê kirin |
| **ko** | kuh, kût bûna aletên bire, wek kêr xencer, şûr tefşo û bivir. Kêra min ko bûye. |
| **koç** | malên ku ji cihekî diçin cihekî, kom çadir. |
| **koç** | bejna darê, ji kokê heya tildan |
| **koçek** | kurê ku direqise |
| **koçek** | di ola yezidiyan de peya ye ku dibe xwedî şir û kesem |
| **koçer** | kuhçer, xweyî koç, kesê ku her demê koça xwe dibe cihekî |
| **koçemal** | koç û tevî xelkên wê. Tevi konan, em koçemal çûn cem filankes. |
| **koçmêş** | cihê mêşhingivê, darmêş, di darê de kunemêş, di sînêr de |
| **kod** | elbika ku pê zad dibirin, biçûk. hest kod welçekek e |
| **kode** | tiştê ku xwedî erd ji xwediyê pez distîne, bihayê ku ji bo pezekê tê sitandin jê re kode tê gotin. |
| **kodel** | kel. wek kevan, qilocên kovî kodelin. |
| **kodel** | bocî, finik tûle |
| **kofendil** | xefîrok, kilora mar. Mar buye kofendîl |
| **kofî** | celebek serpêça jinan |

| | |
|---|---|
| **kok** | riç. bingeh, kok, sar bûyî. Filankes xwe kok kiriye. Min tembûra xwe kok kir. |
| **kokî** | pinpiniya rengînî |
| **kol** | bê qiloç, beranê kol, bizina kol. |
| **kolkirin** | dehfdan û xistîn |
| **kolan** | di taxan de siqaqen dawî birî. Mala me di filan kolanê de ye. |
| **kolan** | kolana erdê vedan. |
| **kolandin** | vedana erdê, kolan |
| **kole** | bende, kesê ku bi mezinekî ve hatiye girêdan û bê wî nikare tiştekî bike |
| **kolinder** | koma darên birî |
| **kolik** | holika biçûk |
| **koloz** | kolos kumê kulavîn ê gewr û dirêj |
| **kolsîvanok** | ji kevokê biçûktir e wek kevokê ye her di nav giya dimîne, firre |
| **kom** | civandina çi tiştî li ser hev. koma peyan, koma daran, koma axê |
| **komik** | koma biçûk |
| **komir** | rijû |
| **kon** | çadira reş, perçên kon, sirît, guliçk, çasir, nêvber, perispan, tej. tayîj, stûn, kêlik. xurt, rewag, çît, berçit, hical, pargun, sing, bersing, ping, tirîj, çap. kon vegirtin, kon vedan. kon ji dar danîn |
| **kone** | serwextê ku nakeve dafikan, berbir, tecrûbe dîtî |
| **konik** | liva ku ji karikên hîtikan tê girtin |
| **kop** | kope, pûstikê çavan, serê kiloşkê |
| **kopal** | ji çekên kevin gurzê bi heçî çengel |
| **kopik** | serê tehtê zirav û bilind |
| **koplane** | qûlûpane, teqle, li ser serî xwe qulûpandin |
| **kor** | kûr, bêçav, koranî pê de hat |
| **kordûde** | bêwest, korocax, bê kur mirin |
| **korebeşk** | koremişk, mişkê  lûr, xild |
| **korerê** | şeqama ku taliya wê tine, di kolanan de riya ku dawî nîne, li dîwar asê dibe |
| **korik** | celebek nexweşiye ji genim çar dibe. Pê genim reş dibe. Genimê me bi karik e. |

| | |
|---|---|
| **korkorî** | kelmeşa bê deng |
| **kornigan** | koringan, celebek giya ye, di salên xelayê de tovê wî tevî genim dikin û dixwin |
| **kort** | çalên ku ji erdê çar dibin, an tên vedan. Ez ketim kortekê. |
| **kortal** | korta ku bi xwe, an go bi tesîra baranê û lehiyê ji erdê çêdibe. Dora gund tev kartal in. |
| **kortik** | korta biçûk, kortika çavan, kortika sito |
| **korsker** | çilak, yek ku caw dike, cûlak |
| **kot** | bi diranan tiştek gotin. Wê hestî kat. |
| **kotan** | gîsinê mezin. Me erdê xwe bi kotan vekir. |
| **kotek** | zor. ez bi kotekî şandim, kotek ez giham wan. |
| **kotekî** | zorkirî, bi kotekî em dêpê bidin kirin |
| **koter** | |
| **kotin** | kotina dar, kotina hestî |
| **kose** | kesê ku riha wî gelek firk e, ne gurr e |
| **kostek** | jina qewadiyê dike. |
| **kostek** | zincîra kurt û pehn ku bi saetê ve dikin |
| **kostekî** | qewadî kirina jinê |
| **koş** | pêş daw, himbêz, cihê parastî |
| **koşkar** | solker |
| **koşkeh** | celebek hirmê |
| **koşik** | celebek tasikên avê ji heriyên çê dikin |
| **kovar** | civar mecelle |
| **kovik** | gewriya meşkê gazê konika ejmû |
| **kovî** | kûvî. pez kovî, ga kovî, kohî kûhî, herçî. herywanê ne kedî |
| **kox** | xaniyê ku bi hişkeberê lê dibî û bêkêr, ji xirçik hinekî çêtir. |
| **koxik** | koxê biçûk koxik: xêli destmala hewirşîm ku davêjin ser çavên bûkê |
| **koz** | pel, kozê agir, koz, di goman de cihê ku ji bo kar û berxan bi cîtekî vediqetînin koza berxan. koz. Di nav kon de cihê ku ji bo bûkê bi çitekê vediqetîn in, koza bûkê, cihê ku bi citê tête veqetandin |
| **kozane** | celebek tiriyê lib gir, kozaneyê spî, kozaneya reş |

| | |
|---|---|
| **kozik** | çeper, cihê ji bo nêçîr an ji bo şeran tête çêkirin, çeper tenê ji bo cihê şer lê kozik ji bo cihê nêçîr û şer re tête gotin |
| **kozî** | dûvik, guçê, dawiya çav ê hêla guh. koziya çav, dû vika çav |
| **kozlax** | kozax, koxik, xirçik, xaniyê biçûk ê pîsik |
| **kubar** | ziraviya sinçî, delalî filan peyakî kubar e |
| **kubarî** | kibar bûn, zirav raman bûn |
| **kuç** | kevirê ji hinmarekê mezintir û hişk |
| **kuçkanî** | kufkanî, kevirkanî, kevkanî |
| **kudandin** | dan ser pişta tiştekî û ji bo girtin an qîhanê li pê çûn. Me ew kudand, kudand em negihanê. |
| **kufik** | ji şilahiyê pasika gewr ku tê cil û depan, ji pir mayînê pasika gewr ku dikeve xwarinê, kevnî, bêkêrî. Xwarina me kutikî bûye. |
| **kufikî** | kufik girtin |
| **kufr** | bê bawerîtî, xwedê ne nasîn, ji rastiyê revîn |
| **kufristan** | cihê ku kafir tê de rûdinin, welatê kafiran |
| **kufrît** | kirkuta zer |
| **kuhderî** | deriyên ser top, sergillî |
| **kul** | girêk û nexweşiyên ku li rûyê cendekê mirov dertên, êş. tiliya min kul bûye, kula devbernexûn, an dernexîn |
| **kulab** | penceyên teyran. Teyr bi kulabên xwe nêçîrê dike. |
| **kulabe** | guhmîr, gunmîr, darên ku dikevin dor sitoyê ga bi mîr re |
| **kulandin** | li ser lingekî bi rê birin. Min ew kuland, dikule, kulîn |
| **kulat** | perçê berfê ku tevî axê hişk dibe, kulatê berfê |
| **kulav** | ji lêva pez çêdibe ji bo li ser rûniştinê û kepenê şivanan |
| **kulb** | kesê xwerok, pir xwer. Filan peyekî kulb e. |
| **kulêçe** | paste, getto |
| **kulêmek** | goştê serhela ranan dor qullê, bin qalçê |
| **kullik** | kumê kulavîn, ku çiyayî didin serê xwe |
| **kulind** | celebek kundire zer û gewrên wan hene, zivistanê tên xwarin |
| **kulindir** | celebek gundirê ku zivistanê tê xwarin |
| **kuling** | wek bivirê biçûk pişta wî wek serê çakûç silahek bû. |
| **kuling** | çakûçê mezin ê du serî ku pê keviran dişkênin |

| | |
|---|---|
| **kullî** | gelek celebên kullî hene, ên ku zad dixwin evin, kuliyê beşik ê ku nafire. kuliyê bejik ê ku difire |
| **kulîçe** | kilorên ku di cejnan de çê dikin, hêk şekir û şîr têxin hevîrê wê |
| **kulîçik** | kilorên biçûk, roja berî cejnê, roja kilora |
| **kulîlk** | qûlçîçekên renga reng |
| **kulîn** | di malê de cihê ku zadê malê lê datînin kiler |
| **kulm** | gurmist, min kulmek lê da. Kulmek zad bide min, mist |
| **kulovan** | xweyî derd, filan kulavan e. |
| **kulpik** | meyikên biskocan ên di ser ve ku ji tayê hebîrsimê badayî çê dikin |
| **kum** | ew serpûsê vêl ku kurd ji caw an derî çêdikin û didin serê xwe. Ji hemî tiştên ku didin serê xwe re kûm tê gotin |
| **kumtek** | papûç, papûçên ku me ji cerm çê dikin |
| **kumbirr** | di serê çiyan de girê bê kevir |
| **kumik** | binî, dawî, qorç, kumika cigarê |
| **kumî** | di bin erdê de li beriyê dibin xwarina wan xweş e |
| **kumkafir** | kesê kumê mezin beht dide serê xwe. filan kumkafir e. |
| **kumzirx** | kumê hesinî ku leşker di şer de dide serê xwe |
| **kun** | qul, cihê ku fîşek bikare tê re derbas be, kuna guh, kun hirç, kun berf, kun gêre |
| **kunn** | çermê mêriyan ku ji bo avê debax dikin, kunnê avê |
| **kuncî** | libên wê hûr in, dikeve gelek xwarinên şeranî danê wê têxin helawê |
| **kund** | bûm, teyrekî bêyom e, li kû deyne xopan dibe, ew bi xwe her di xerban de têditîn |
| **kundevî** | |
| **kundir** | gelek celebên wî hene, hinek tên xwarin û celebek jê nava wî vala û bi serî ye, gundî pê avê dikişînin |
| **kunevêl** | kun an înên ku hin heywanên biçûk di teht an dîwaran de çê dikin . ji koxikên pîs re jî tête gotin |
| **kunêr** | kullekê ji laşa mirov dertê û kêm digire û rihet dibe. kurd dibêjin kumêr qirêja di laşa mirov de bi dertêxe. |
| **kungeh** | cihê ku kunn an cerrê avê datînin ser |
| **kunik** | kuna biçûk, cihê ku çivîk dikevinê. |

| | |
|---|---|
| **kunik** | miyên zirav ku bi çermê hîtikan ve |
| **kupiyan** | bi zor û lêketina tiştekî hişktir pelixîn. ev firaq dakupî ye. |
| **kurr** | law, kurê filên, kurr, serî kurrê min kurrê çiyê, serê çiyê |
| **kurr** | çav netêr, xwerek, çavkurr |
| **kuraze** | perçek ji kitêbê, kitêbok |
| **kurd** | daketiyên med, navê gelê kurd |
| **kurdî** | her tiştê ku ji bo kurd e, zimanê kurdî, govenda kurdî, stranên kurdî |
| **kurrebeşk** | heywaneke di ber çeman de dijî, rengê wî sore û enî û bin zikê wî belek in. garisan dixwe û pirr qelaw dibe |
| **kurreza** | nevî ji aliyê kurr ve |
| **kurî** | kuna ku di aletên hesinî de. kuriya derziyê. kuriya tevir. kuriya bivir. kuriya tefşo |
| **kurrî** | sîpeya kerê kurrî. kurrik |
| **kurîşk** | porrê civiqî. helqe bi helqe. porê hebeşiyan kurîske |
| **kurrît** | bi ser avê de xwehr bûn û devê xwe xistinê û vexwarin. Filan kuritî avê bû. yanê bi ser de xwehr bû û devê xwe xistê û vexwar. |
| **kurk** | mirîşka ku li ser hêkan rûniştî û diya çêlikan ku wan digerîne. mirîşk" me kurk bûye. |
| **kurk** | serpiyê ku ji kavilê berxan û hin heyvan çêdikin kurkê barxinî, kurkê kuzînî. kurkê rovinî. |
| **kurm** | ji tevayiya kurikên biçûk ku li ser erdê dikişin re kurm tê gotin |
| **kurmatî** | ji navê berjêr tevî kulemekê heya çokan ji wa n goştan re tê gotin |
| **kurmorî** | gêrikên hûr zerik pir biçûk |
| **kurmovî** | ketina kurman a tiştekî. Filan dewar kurmayî bûye. |
| **kurn** | |
| **kurpandin** | daqultandina avê, Filanê av dakurpand. |
| **kursî** | ji depan çêdikin ji bo rûniştinê |
| **kurşe** | berfa ku baran bi ser de dibare û paşê wek kevir hişk dibe |
| **kurt** | kin. qut. kurt kirin |
| **kurt** | teyrekî mezin wekî sîsalik |
| **kurtan** | palika kerê. Kurtanê kerê min di hev de ket. |
| **kurtanker** | kesê ku kurtanan çê dike |

| | |
|---|---|
| **kurte** | hespê pîsik û bêkêr. lê qelaw |
| **kurtik** | qutik. cileke di ser kincan de li xwe dibe dirêjî heya navê ye. dema bê pî be jê re îşlik. sixme tê gotin |
| **kuskusok** | kesê ku çavên xwe pirr çavên wî kuskusakî ne yanê çavên xwe pirr dikute |
| **kuskî** | hesinê dirêj ku pê keviran hil dikin |
| **kuştar** | kesê ku dikuje. ew kuştarê bav û kalan in. |
| **kuştin** | bi çi awayê canê yekî jê birin. Wî bavê me kuşt. |
| **kut** | dehf. min ew da ber xwe û kut kir. kutke. |
| **kut** | darê ku wek situnan didin ber maxên şikestî. Me kutek da ber wî maxê şikestî. |
| **kuta** | qedî, xilas. Şûxûlê min kuta bû. |
| **kutan** | lêdan û pelaxtin. Me dan kuta, bikute |
| **kutan** | qayîn, mayin, filanê kutanek kir. bikutê. |
| **kutandin** | tiştek dan kutan. Me danê wan dikuta |
| **kutasî** | dawiya dawiye. Kutasî wî gotina min xist serê xwe. |
| **kutebirr** | kin birîn. vî tiştî kutebir binivîse. |
| **kutefirr** | warît, celebek teyrên biçûk, warît |
| **kutik** | çêlikê hirçê |
| **kutilk** | celebek xwarin ji savar û goşt çêdikin, gelek texlîtên wê hene |
| **kuvarik** | kifkar, kefkevak, totik, kakivîlk, fitirk, di erdê de û li dor ceman gelek dertên, lê ên çiyan be ji durî av xweştir in |
| **kuxik** | ji ber sermê an ji ber nexweşiya sîngê dengê ku ji sînga mirov tê. Min serma girt û gelekî dikuxim. |
| **kuxikî** | kesê bi kuxikê dikeve, her dikuxe |
| **kuxîn** | kuxik pê re derketin |
| **kuz** | quz, cihê mîzê û zayinê bi jinan re |
| **kûç** | kûç dengê ku pê gazî she dikin. |
| **kûçak** | mêrtalên ku datînin ser maxên xaniyan |
| **kûçik** | she, seg, bocî |
| **kûje** | simore, heywanekî biçûk e li ser darên gûzan û di kokên daran de dijî |
| **kûp** | ji axê çêdikin ji bo avê, ji bo rûn û penîr |

| | |
|---|---|
| **kûpik** | kûpê biçûk |
| **kûr** | binê wê dirêj dûr ne vêl, ev bîr kûre. kûr kirin, kûr bûn |
| **kûre** | argûnê hesinker |
| **kûrik** | berîk. Diravê min di kûrika min de ye. |
| **kûşik** | kundirê acê ji bo sobayiyê bikêr tê |
| **kût** | kesê ku lingên wî tev nagerin. filan kût bûye. |
| **kûtî** | nexweşiyek pîs e. Filane kûtî bûye. |
| **kûvan** | êş, derdên ku ji dil peyda dibin |
| **kûz** | kûzikê avê şerbik |
| **kûzer** | piştî bêjing kirina genim sap, gurnîg û qirêja ku di bêjingê de dimîne |
| **kûzik** | şerbikê biçûk |
| **kûzîn** | dengê ku ji cewrikê sehan tê, kûz kûz |

# L

| | |
|---|---|
| **lût** | pozê dirêj û zirav |
| **labûte** | lawût, hesineke bi serê misasê ve, pê axa ku bi halet ve paqij dikin |
| **laçik** | destmala ku jin davêjin ser serê xwe |
| **laçîn.** | |
| **lahûr** | celebek hesinê şûr û xenceran, lê pir baş |
| **laje** | diayên ku mirov ji bo xwe dike, ji bo xwe ji xwedê xêr xwestin |
| **lajebêj** | kesê ku dian dike, diago |
| **lak** | xwarina ku ji bo sehan çê dikin |
| **lakin** | cihê ku se tê de xwarinê dixwe, korm |
| **lal** | kesê ku nikare bi carekê bipeyive |
| **lalijîn** | di ber gerin. ez çiqas lalijîm wî guh ne da lavayiyên min. |
| **lalî** | zal bûn. lalî, celebek sihan ku savar û birincê têxinê |
| **lalker** | texlîtek listik ku kes napeyive û her tişt bi îşaretan e |
| **lam** | gep, gulpik, gewra lam bi deq |
| **lamçî** | lamijek, şepal |
| **lan** | |
| **landik** | dergûş |
| **lar** | cihê ku ga û gamêşan lêxinê |
| **lastîk** | kawçûk, nerm e tê kişandin dirêj dibe, dema berdî dicive ser hev |
| **laş** | cendekê mirî, laşa çêlekê |
| **laşe** | lasa ku çermê wê li ser radikin |
| **lat** | nivîn, |
| **lat** | zinarê mezin |
| **lava** | daxwaza bi hêvî |
| **lavayî** | lava kirin |
| **lavekar** | kesê hergav lavayî dike |
| **lavelav** | bi dilekî satî, di ber xwedê gerîn |
| **lavijok** | celebek stran, stranên biçûk, |

| | |
|---|---|
| **lavij** | stranek bi serê xwe, li ser mîr Mihemed dibên |
| **lavlavik** | giyayê pêçekê |
| **law** | kur, ev lawê filan e. |
| **lax kirin** | las kirin |
| **layiq** | hêja, ev ne layiqî te ye. |
| **layîn** | bi henekan bela xwe di yekî dan |
| **lazim** | hewce, ev tişt ji min re lazim e. |
| **lebak** | gellac, desas |
| **lebat** | perçek ji tiştekî, dest lebatekî cendek e. Mirovek lebateki civatê ye. |
| **lebê** | li bê, belê, erê |
| **lebitandin** | livandin, destê xwe bilebitîne |
| **lebitîn** | livîn |
| **lebîn** | |
| **lebîxe** | peloka ku ji bo dermanan çêdikin |
| **lebt** | rewş, hal |
| **lec** | şer, pevçûn |
| **lecimîn** | sivik kulîn. filan ji lingê rastê dilecime. |
| **lecûc** | aqil sivik, lezok, ne serqrran |
| **legen** | firaqa mezin ku tê de hevîr distrên an şorbê têxinê |
| **legleg** | teyrekî şîp û nikul dirêj e, li dara gundan li ser daran hêlûna xwe çê dike |
| **legleg** | navê teyrekî |
| **lehandin** | arqilandin, bi gotinê kir, an çûna wî bi şûn de xistin |
| **lehen** | kun hirç, cihê ku hirç zivistanê tê de dimîne |
| **lehî** | ava barana şên dema li ser rûyê erdê diherike û tiştan dide ber xwe |
| **lehîm** | bi heve nûsikandina maden, min beroşa xwe lehim kir. |
| **lehîn** | misînê ji axê |
| **lehf** | gotinê giran, bi mana. Wî lehf avêtin min. |
| **lehtik** | di çiyan de perçê erdê ê biçûk |
| **lek** | deh hezar 10.000, sed lek û sed hezar bin li pêş wî ne tewa ne. |

| | |
|---|---|
| **leke** | qirêj û gemara ku naçe |
| **lekitîn** | |
| **lem** | mewa werz, lema zebeş, lema kundir |
| **lemisandin** | xwe civandina ser hev, an jî tirsan an ji serman |
| **lemisîn** | civîn serhev, filan lemisiye. |
| **leng** | bi lingekî, topel |
| **lenger** | hesinê mezin ku bi keştiyan ve û dema rawestîne an bilekê berdide avê, keştiyê lenger berda avê. |
| **lengergîr** | zincîra ku pê lenger girêdayî ye |
| **lengerî** | legan, sîniya mezin ku girarê têxinê |
| **lep** | pehnahiya dest tevî tiliyan |
| **lepandin** | xapandin |
| **lepetîr** | lepa ku ji dan û goşt çêdikin û pir dikelînin |
| **lepik** | tetik, destgore, ew tiştê ku ji bo parastina lepan ji rîs, an çerm çê dikin |
| **lepiyan** | |
| **lepok** | xapok, kesê ku xelkê dixapînin, xapok. |
| **lepok** | heywanekî wek pîrikê pinde jê re pîrepind jî tê gotin |
| **leq** | liv, bi leqan diçû. leqek da xwe |
| **leqan** | leqiyan leqîn, livîn. liviyan |
| **leqandin** | livandin |
| **leqat** | civandina lib an simbêlên zad ku li pirêzê dikevin, jin çûn leqa tê. |
| **leqatvan** | kesê ku diçe leqatê |
| **lerizandin** | ricifandin |
| **lerizîn** | ricifîn |
| **lerzek** | erdê ku ji ber baranê dadikeve lerzek li erdê neketiye .. |
| **leş** | cendek |
| **letan** | letiyan, bêdeng, ker, aş |
| **letandin** | aş kirin, ker kirin, wî zerokî biletîne. |
| **lewitandin** | qirêj kirin, pîs kirin, bê mirês kirin |
| **lewitîn** | qirêj bûn, pîs bûn, bê mirês bûn |
| **lewleb** | lalep, derikên ku bi dest û lingên meşkê ve girêdidin û pê dikên |

| | |
|---|---|
| **lewneş** | bêkêr, kiz, ne tewa, filan, lewneşek e. |
| **leyistin** | lîstin, bi çi celebî bêhna xwe derxistin, babetên leyistikê gelek in |
| **leyizandin** | lîstikandin, bi leyistin dayîn |
| **leyizîn** | lîstin, bêhna xwe derxistin, me bi dame lîst, an leyist. |
| **leyî** | lehî |
| **leyz** | gelek in, eve hin celebên wê, tawle, holî, dame, çirrê, setrenc, birrê, nehberik, terş, sêberik, gurle, segav, kerikê melê, lûşte, mome, çere, apê mûs, tewş, kevirê goncê, bawûrtan |
| **leylan** | pepirk, li çolê ji ber germa royê, dûrve wek avê xuya bûn. Filên daye pey leylanê. |
| **lez** | zû, bê xwe ragirtin, bi lez hat |
| **lezandin** | lez kirin, min erdê xwe lezand. |
| **leziyan** | xwe lezandin |
| **lezîn** | lez kirin |
| **lê** | edata bangkirina mê ye, lê were, lê lakin, ez çûm lê tu nehatî. |
| **lêanîn** | rastanîn, me derba xwe lêenî. me kês lêanî. |
| **lêbûn** | |
| **lîç** | çemên biçûk ku bi newalan de diherikin |
| **lêdan** | lêxistin, min kêr li destê xwe da yanê, bi kêrê min destê xwe birî. |
| **lêf** | kûntar, lêfa çiyê |
| **lêgerandin** | lê pêçan, destên xwe li sitoyê wî gerand. şev lê gerîn. |
| **lêgirêdan** | sipartin, bervê kirin ew mesele il min girêdan. tifing li me girêdan. |
| **lêhatin** | rast hatin, lêhatin ji jêhatinê çêtir e. |
| **lêhatin hev** | di her alî ve bi ser de hatin. Tav li me hat hev. |
| **lêkanîn** | lihevanîn, me ew lêkanîn. |
| **lêkdan** | li hevdana hin tiştan |
| **lêketin** | li tiştekî ketin. ez bêhemtê xwe lêketin. |
| **lêkirin** | bi serde kirin, lê bar kirin. Av li destê bavan kirin. Bar li dewêr kirin. |
| **lêkhatin** | rast hatin, li hev hatina tiştekî. Şolê me lêkhat. |
| **lêkvekirin** | leyve kirin, parve kirin, me malê xwe lêkvekir. |
| **lêlav** | ava berfê an qaqê [qeşa] |

| | |
|---|---|
| **lêmişt** | dar û berên ku lehî dide ber xwe û tîne |
| **Lêpehn bûn** | li ber resîn û dar û berge jê birin. Em li dijmin pehn bûn. |
| **lê nelê** | di lîstikê de, cik, netik, qebul e, ne qebul e |
| **lêp** | hîle |
| **lêpok** | lêvok, qeşmer, mesxere |
| **lêv** | lêvên ser diranan, her du tek deriyên dev, bi keviya her tiştî re lêv tê gotin |
| **lêvok** | lêpok, qeşmer, mesxere, wî xwe kiriye lêvokê xelkê. |
| **lêxistin** | lêdan, wî li biçûk xist, ew lê dixe. |
| **lib** | heb, liba genim, libek dû lib |
| **li ber dan** | ji bo razî kirina mirovekî pê de gotin, min li ber da û neda rezî nebû. |
| **li ber hev dan** | bi qirên li ser tiştekî peyivîn |
| **li berketin** | ji bo tiştekî pir xeyidîn û ji bîra nekirin |
| **li berketî** | kesê ku ji bo tiştekî dixeyide, têşe |
| **li berxwedan** | kefteleft, me gelekî li ber xwe da, lê dawî zora me çû. |
| **li berxwe ketin** | ji bel kirekê bi fihêtî xeyidîn |
| **lihêf** | mitêl |
| **li hev** | li hev ketin, li hev dan, li hev qelibîn, li hev herbilîn, li hev bûn |
| **li hevanîn** | piştî xeydê berve hevanîna hinekan. Me ew li hev enîn. |
| **li hevbadan** | zor li hev kirin û rê li hev girtin, me lê bada. |
| **li hevdan** | li hev xistin. Wan li hev da. |
| **li hev derêxistin** | tiştek ji nav tiştekî derêxistin, dozek safî kirin |
| **li hev derketin** | weke hev hatin, çûn ser gotinekê, gotina me li hev derket. |
| **li hev hatin** | piştî xeydê li hev razî bûn. Ew li hev hatin. |
| **li hev hatî** | kesê ku piştî xeydê bi neyarê xwe re li hev tê |
| **li hevketin** | li hev bi şik bûn, xeyidîn. Ew li hev ketin. |
| **li hev pehn bûn** | li ber hev fireh bûn û xwe ji lêdanê re pêkanîn. Em li ber hev pehn bûn. |
| **li hev xistin** | li hev dan, wan li hev xist. |
| **limlate** | |

| | |
|---|---|
| **ling** | libatê ku mirov pê bi rê diçe, ling avêtin ber, ling cî girtin, ling lêdan |
| **li ser xwe girtin** | girtina tişteke ser xwe |
| **liva** | heriya berxikan |
| **livandin** | tiştek li cihê wê rakirin û danîn cihekî din, an di cihê wî de leqandin. me tiştek nelevand. |
| **livîn** | tevgerîn |
| **li xwe borî** | kesê ku hesabê mirin û mayina xwe neke |
| **li xwe danîn** | kemanî qebul kirin, qîma xwe bi bindestiyê anîn |
| **li xwe kirin** | wergirtin, li xwe kirina cilekî |
| **li xwe qulibîn** | li şopa xwe vegerîn |
| **li xwe xebitîn** | dest birina xwe |
| **lîç** | ji bo civandina ava çend coyan pengava ku çê dikin, lîça me tijî av bûye. |
| **lîfik** | lîfê ku pê xwe dişon |
| **lîlkirin** | qasik derxistin |
| **lîqe** | lîka poz, pilîşkên çavan, şilîq |
| **lîs** | lûs, cihê ku teyr, kew û kevok bi şev tê de dilêsin |
| **lîsihan** | ketin lîsê, kew lîsihan. |
| **lîsihandin** | lûsihan, xistin lisê, xistin lûsê |
| **lîwan** | gem, lîwana hespê |
| **lo** | lawo, edata bangkirina mêr e, Lo were |
| **lod** | koma bilind, mezin loda kayê, loda ceh |
| **lodik** | loda biçûk |
| **lok** | heştirê nêr |
| **lop** | kesê di hemî kirên xwe de giran, tiştê ji hemdê xwe zêde sitûr |
| **loq** | bê fesal, dirêj û hinek xwehr |
| **loqandin** | dewarek loqloqî ajotin, ne çargav, ling bi ling |
| **loqîn** | loqloqî rêve çûn |
| **loqmeqadî** | xwarineke ji hekan, ard û mat çê dikin |
| **lorandin** | ji zarokan re bi şewatî nehwirandin |
| **lorik** | penîrê lor |

| | |
|---|---|
| **lorî** | kilamên ku ji bo xewandinê bi deng ji zarokan re tê gotin |
| **lorx** | heriya ku tevî berfê dibe |
| **loş** | nanê sêlê ku hevîrê wî bê hevîrtirş e |
| **lot** | hol bûn. ew dide lotan, an lotikan. |
| **lotik** | latên biçûk |
| **low** | fasuliye |
| **lowik** | ew ji celebek sebze ye tê xwarin,ji lawan gelekî biçûktir û libên wê ji ên lav girovertir in |
| **lox** | berfa ku dest bi helînê dike |
| **lûçandin** | livandina dûvik, riya, temelliq, filan ji filanê re dûvik dilûçirie. |
| **lûçikandin** | şêlandin, ji kirasê wî kirin |
| **lûçikîn** | hatin şêlandin |
| **lûl** | qamişê hundir vala |
| **lûle** | çi tiştê dirêj hundir vala, çi hesin çi dar, lûla tifingê |
| **lûleb** | depê ku datînin pişt deriyan heya venebe |
| **lûlik** | lûleya zirav û biçûk |
| **lûrik** | rehekî bin erd wek qamîş e, lê gelekî tehl e |

# M

| | |
|---|---|
| **ma** | edata pirsiyar. Ma tu kînga hetî? Ma te ez dîtim? |
| **maç** | ramîsan. maç kirin |
| **mad** | navê milletê kurd ê kevin. Kurd ji nijadê mad in. |
| **madek** | camûsa mê |
| **madekirî** | kesê xeyda wî ji rûyê wî dixwîne, bi pirrûz |
| **maden** | hesin, bagir, şîv, şêr, şirêç ... çi tiştê bi germkirinê dihele û bi sarbûnê hişk dibe |
| **mafir** | madam, mafir tu neçî divê yekî din herre. |
| **mahî** | hestiyên ku jê şehan çê dikin |
| **mahon** | kokê mêwan ku jê destiyê kêran çê dikin |
| **mahû** | mehû |
| **mak** | 1. dê, 2. dor, 3. havinê penîr ku ji sîllafên berxan çê dikin |
| **maker** | manker, kera mê |
| **mal** | heyîn, dewlemendî, filan maldar e, |
| **mal** | xanî, cihê ku mirov lê radibe rûdine, radizê. ez çûm mal. |
| **malavayî** | di dan sitandinê, an di bazarê, an di dana heq de camêrdî an têborîna hin ji cemeke. Malavayî ji heq çêtir e. |
| **malbat** | çend malên ku bi navekî têne hildan, malbata Baban, malbata Ezîzan |
| **malcehnû** | kîsê ku cehnû di nav de, wek mal zarok |
| **maldar** | xwedî mal, dewlemend |
| **maldarî** | xwedî mal bûn, dewlemend bûn |
| **malêle** | qerrase, ji bo hilkirina keviran, hesineke |
| **maliştin** | malan, malandin, me mala xwe malist, me mal damala |
| **malnivîn** | di malê de cihê ku nivîna lê datînin |
| **mam** | ap, am, pismam, kurap, dotmam, keçap |
| **mamik** | gotinên bi qafiye. mêrê çê, bi kêrî her tiştî tê |
| **mamiz** | mampez, xezal |

| | |
|---|---|
| **man** | mayin, neçûn, nebirîn .Mayîna me tiştekî baş bû, Mayîna wî tiştî ji me re bi kêr hat. |
| **mana** | tefsîr, tercime. Nivişt bi mana berbejnê ye. |
| **mang** | |
| **mange** | çêlek |
| **mangêr** | ji bo rastkirina axa ajoti, aleteke bi dewar dikişînin |
| **maqûl** | pêşî. serek, rêsipî, maqûlê eşîrê, maqûlê gund |
| **mar** | marê reş, marê tixbelek, marê gewr, marê kor, ejderha, tîrmar, ejdiya |
| **mareke** | |
| **margil** | celebek teyrê dirinde, maran dixwe |
| **marî** | kewa mê |
| **marmaroşk** | marîjok, heywaneke biçûk û wek maran e, lê bê jehr e |
| **marmasî** | celebek masiyê wek maran e, goştê wî gelekî hêja ye |
| **martak** | |
| **mase** | ji depan çêdibe, çar lingên wê hene, ji bo nivîsandin û xwarinê tête şixulandin |
| **mazûban** | mêvandar, kesê ku mêvanan dihewîne |
| **masî** | di avê de dijî, goştê wî tê xwarin, gelek celebên wî hene û hinek jê ev in tewr, terixî, zerik, ferx, şebot, siring, çêlekî, berat, gur, reşik, çopiç, bizrî, ricuk, mirtolek, marmasî. sergolik, qamasi. simbêlek, kulûçîrnar, şelq |
| **mast** | şîrê meyandî, mastê tûr, mastê girtî |
| **mastek** | gewriya ku pê mast berdidin meşkê |
| **mastmotî** | mastmotî, tevîhev kirina mast û mot |
| **masûr** | celebek meywe, qizilclq |
| **maş** | debar, ceneke, alifê dewar |
| **maşandin** | bi şuxulandina pir tiştekî hişk jê birîn, devê kêrê masî ye, binê salê masî ye, sabûn masî ye |
| **maşe** | pelgir, ya ku pê kozên agir radikin |
| **maşela** | ji şêr û şîv çê dikin û jin têxin sitoyê xwe |
| **maşîn** | maşiyîn, wek sabûn, an hesin jê çûn û helîn |
| **maşot** | qunbil, kurmeke li genim dikeve |

| | |
|---|---|
| **mat** | gêj, bêraman, şaş, nizane çi bike. Çima tu welê mat maye? |
| **mator** | gêjok, ehmeq, serserî, Filan matorek e. |
| **mayîn** | neçûn, ji cihê xwe nebivîn, mayîna wî li vir ne tiştekî baş e. |
| **mazbir** | celebek nexweşiya miyan |
| **mazî** | bi daran ve dibe û ji bo debaxê bi kêr tê |
| **mazîçin** | kesê ku maziyan diçine |
| **mazmaze** | berxê çar salî, beran |
| **mecbur** | kesê bêhemdê xwe kotekî, wan ez mecburî çûnê kirim. |
| **mecer** | navê celebek tifingê kurmancî ku di dev re dihatin dagirtin |
| **mecrefe** | celebek bêrên depînî, pê berfê rêş dikin |
| **mecûce** | dil şikestî bêhêvî. Filan bi carekê mecûce bûye, an maye. |
| **medreb** | erdê ku ji bo çandina birincê pê tînin |
| **mefsel** | kevirên ku ji bin erdê dertên û hilû û li ser hev, an di ber hev de ne |
| **mefşen** | teneşo, depê ku miriyan li ser dişon |
| **megene** | dolepa hesinî |
| **meh** | sî roj, navên mehan evin, adar, nîsan, gulan, hizeran, tîrmeh, tebax, êlûn, çiriya pêşîn çiriya paşîn, çille, berçille, sibat |
| **mehder** | hêvîkarî ji bo hinan, divê tu mehdera me li cem filanê biki şefaet, |
| **mehdervan** | kesê ku mehdera mirov dike |
| **mehfe** | tod, tada ku li ser pişta hêstiran çê dikin û jiyan têxinê |
| **mehik** | kinc, xwîna ku ji mehê carekê ji jinan tê. Filanê mehika wê berî demê têt, an kincê wê hatine, |
| **mehir** | girêka zewacê, jina bi mehir helal e, jina bê mehir heram e. |
| **mehîn** | hespa mê mehîna sorbaz |
| **mehîr** | şorba dew û dan mehsere 1, enbara avê ku di tehtan de dikolin. 2. en bara şireya tirî ji maden mesra avê, mesra şîreyê |
| **mehsûr** | masûra ku pê tevnê çê dikin, a çilokan têxin nava makûkê |
| **mehter** | meyter, mija tenik ku wek dû dadikeve rûyê erdê, maran |
| **mehwar** | mecal, hêvî, karîn, ez bê mehwer mame. |
| **mehan** | xira bûn, neman |
| **mehandin** | xira kirin, nehiştin, paqijkirin |
| **mehcet** | hewce bûn |

| | |
|---|---|
| **mehfûr** | xalîçe, mehfûrên. Êranê gelekî çak in. |
| **mehilandin** | bê hêşînayî hiştina cihekî û xerabe kirin |
| **mehilîn** | bê hêşinayî man, xirabe bûn |
| **mehrûm** | bêpar, ezji wê qençiyê mehrûm hiştim. |
| **mehwî** | beraza mê |
| **mehzûn** | dil şikestî, bê mad |
| **mejî** | mejû, mêjî, ew tiştê di nava kilox de ku zanîn û jîrî ji wî tê. Filan bê mejî ye. |
| **mekr** | bela, şer, xêrnexwastin |
| **mekûk** | hesinê wek masiyan ku çilak masûrê têxinê |
| **mektûbî** | celebek getto ye ji mat, findiq û behîvan çêdikin |
| **mela** | kesê ku ilmê şerîetê heya kitêba Mela Camî dixwîne, ji hemû zanayên dîn re tê gotin |
| **mellaq** | lûçek kesê ku ji her kesî re erdê rast dike, lûçek |
| **mellaqî** | ji xelkê re erd rast kirin, dûv lûçandin |
| **melaqî** | celebek hirmê ku di payizê de bi dertê |
| **melben** | destmal, ku jin peçayî didin dor serê xwe |
| **meletîk** | celebek sêv ko nîzîkî zivistanê dibin |
| **melevan** | soba, ajnêber, kesê di avjeniyê de xûrt û jêhatî |
| **melevanî** | sobahî, avjenî |
| **melisandin** | telandin, bi erdê rê nizim kirin. Wî xwe melisandin, wî xwe teland. |
| **melisîn** | bi erdê re nizim bûn. Ez melisîm. |
| **melû** | di çinîna zad de destiyên biçûk ku palîçê dikin, dema gelek destî hatin ber hev dibin, diraxe |
| **melûl** | dilşikestî, bê kêf |
| **memik** | pêsîr, çiçik |
| **men** | ava peng ku neherike |
| **menc** | genimê perîreş |
| **meqam** | çi awayek ji awayên raz û dengbêjî. filan meqam ji min re gelekî xweş tê. |
| **meqepç** | |
| **meqlik** | tewe |

| | |
|---|---|
| **meqes** | tawbir |
| **meqesok** | |
| **merr** | aleteke ji bo kolana axê, bi lingan di axê de dikin xwehr |
| **mer** | mirx |
| **merajo** | celebek sebze ye, helyam |
| **meran** | celebek dar, ji tilayên wê qelûnan çê dikin |
| **meranî** | pezê avê, kerê avê |
| **meras** | meraze, benê ku têxin sitoyê kûçikan. |
| **meras** | salek ji emrê seh, sehê te çend merasî ye? An go çend salî ye. |
| **merber** | cihê ku derî malan pez û dewar lê vedihewînin û bêr dikin. Me pez anî bêrê. |
| **merd** | xûrt, jêhatî, camêr |
| **merdane** | wek xurtan, wek camêran, wek merdan |
| **merdî** | xurtî, camêrî |
| **merdîwan** | silin, pêpiling |
| **mered** | rojen |
| **merek** | cihê ku kayê têxinê kadîn |
| **merezdar** | kesê tim nexweş |
| **merês** | mirês, paqij xweşik, bêmerês: qirêj |
| **mergone** | bangêr, bangore lax |
| **merhem** | dermanê ji bo birînên kewandi çê dikin |
| **merheba** | gotina ku di hevdîtinêde tê kirin, şarota hewandinê |
| **meritandin** | bi tiştekî hişk çiçek ji çermê yekî kirin û xwîn jê anîn |
| **meritîn** | bi tiştekî hişk çîrek lê bûn û xwîn ji çermê wî derketin |
| **mermer** | celebek kevirê çak, kevirê mermer |
| **mermul** | beraza mê ji sê salê biçûktir, ji sê salê berjor mehwî |
| **mersef** | sêniya mezin bi çend qulpan, cifnî |
| **merş** | celebek raxer |
| **merzel** | gor |
| **Meseb** | celebek feqikên ku pê teyran digirin |
| **mesil** | avên wek coyan ku ji bilind cihan berjêr dadikevin |

| | |
|---|---|
| **mesna** | |
| **mesqel** | aletê ku pê maden paqij dikin û diçirisînin |
| **mest** | sist, bêtaw ji halketî |
| **meş** | rêve çûn, meşa wî gelek xweş e. |
| **meşandin** | bi rê xistin |
| **meşîn** | bi rê ketin, em meşîn, em meşiyan. |
| **meşfen** | depê ku miriyan li ser dişon, teneşo |
| **meşhûr** | bi nav û deng |
| **meşlûl** | beniyên ku ji behîv an gûzan çê dikin |
| **meşk** | kavilê pez ê debax kirî ji bo dew. hîz:meşka rûn, hewan ji bo turikê şivana, kun ji bo avê, eyar şîr ji bo şîr, dewl jibo av kêşanê, eyar penîr ji bo penîr, çekur. ji bo goşt |
| **meştel** | cihê ku şitlan tê de digehînin |
| **met** | xweha bavê |
| **metran** | ji keşe mezintir seydayê fillehan |
| **metrebaz** | |
| **mevilîn** | lêgerîn, lewitîn, filan di xwînê meviliye, ango tevde bûye xwin. |
| **mewîj** | mehîj. tiriyê li ber royê hişk kirî |
| **mexel** | cihê ku bi roj pez lê vedihêse. me pez anî mexel. |
| **mexmelat** | tirşiyê şêliman |
| **mexare** | şikefta kûr û dawiya wê dûr |
| **mey** | hestira mê, wek meya malikan. |
| **mevan** | piştî havîn ku şîr dibe mast, xwe girtin |
| **meyandin** | havin, xistina şîr an çi tiştê din, me şîr meyand. |
| **meydan** | qad, meydan lê fireh bû. |
| **meyik** | kunê ku ji bo bişkocan di cilan de vedikin |
| **meyîn** | mehiyan, piştî havîn xwe girtina şîr û rûn mast |
| **mayizandin** | meyizîn, nihêrîn, ji tiştekî hûr bûn |
| **meyl** | xwe bi dil bervê dan. Ew meyla min dike. |
| **meyldar** | kesê ku meyl dike, filan meyldarê me ye. |
| **meyter** | seyîsê ku li hespan dinêre |
| **meyxwer** | kesê ereqxwer |

| | |
|---|---|
| **meyxane** | cihê ku tê de ereq tê vexwarin, an firotin |
| **mezaxtin** | xirakirin, an ji çakî xistin |
| **meze** | xwarinên miz û şoraax ku bi ereqê re tên xwarin |
| **mezel** | ode, çaviyek ji xanî |
| **mezelo** | zeliqok |
| **mezelok** | oda kiçik |
| **mezeloq** | benîştê ku ji koka daran dertê û dikin şeliqok |
| **mezin** | girs, gewre |
| **mezixîn** | xira bûn, ji kêr ketin, pîs bûn |
| **mezrege** | bêrîka ku pê nan davêjin firnê û tendûrê |
| **mezre** | tek malên dûrî gundan, an erdên ku li ser gundekî tên hesêb. Filan cih mezra filan gundî ye. |
| **mûrî** | mîro, gêrik, qûrmorî |
| **mê** | ne mêr, di her tiştî de ya mê jin, kavak, dar |
| **mezixandin** | xira kirin, ji kêr xistin |
| **mêçit** | |
| **mêkutik** | mîrkutik, singik, celebek nexweşiya zaroyan e |
| **mêkutok** | mîrkutik, singik celebek nexweşiya zaroyan e |
| **mişkol** | bijang |
| **mêlak** | |
| **mêlan** | navê darekê, bêhn ji pelkên wê tê, mar ji bêhna wê direve |
| **mêj** | demekî dirêj zû de. ji mêjve me hev nedit. |
| **mêjandin** | bi mitin, şîr an dermanek dan biçûkekî, zaro mêjen, berx mêjan. |
| **mêjok** | zarok an berxê ku ji diya xwe pê ve şîrê her diyekê dixwe |
| **mêr** | xurt, serdes, metirsî, mêr du celebin, mêrê mêrkuj, mêrê xwekuj |
| **mêrg** | cihê ku giya tê de pir dibe û ji bo çêreya dewar tê parastin |
| **mêrge** | xwarina ku ji goşt û pîvazan çê dikin |
| **mesab** | cihê ku kewê ribat an ci la b lê datînin |
| **mêş** | ew heywana ku di nava malan de dijî û li ser rûyê zarokan datîne û nexweşi yê bi lingên xwe re derbasî nav xwarinê dike |
| **mêşhingiv** | hing, mêşa ku hingiv dike |
| **mêşîn** | berve şîn, nîzîkî rengê şîn, çavên wî mêşînin. |

| | |
|---|---|
| **mêşkuj** | ew tiştê ku pê mêşan dikujin |
| **mêtin** | mijîn, biçûk mêt |
| **mêvan** | kesê ku ji dorva tê mala mirov û tê hewandin |
| **mêvandar** | kesê ku mêvana dihewîne |
| **mêvanhewîn** | kesê ku herdem mêvan diçin mala wî û qedra wan digire |
| **mêvanxane** | cihê ku mêvan têde radibin û rûdinin, otel |
| **mêw** | dara tirî |
| **mêwik** | |
| **mêzekirin** | nihêrîn, min lê mêze kir. |
| **mêzîn** | terazî, şehîn, ew aletê ku pê giranî û sivikiya tiştekî seh dikin |
| **mêzer** | |
| **miaf** | kesê ku ji dayinê tête efû kirin. Filan ji dayinê miaf e. |
| **mical** | kês, firsend dem |
| **micik** | di kirinê de lez, filan peyekî micik e. |
| **micin** | |
| **micvî** | |
| **miç** | ji bo çavan tê gotin, girtî. filan çavên xwe miç kirine, çepê bel |
| **miçilgeh** | li ser tiştekî şert kirin, rihan, me li ser filan tiştî miçilgeh e, an miçilgeh kir |
| **miçirandin** | destên hev guvaştin, silav kirin |
| **miflis** | kesê iflas dike, rût û bê mal û dirav dimîne |
| **mifsik** | çilqefes, firaqa nava wê kunkunîşk ku pê xwarinê ji avê diparzinin |
| **mift** | bê biha, bê qîmet, gotina vala, mift û belaş |
| **mifte** | kilît, mifta derî |
| **mih** | peza mêsînî ku ji çar salê borî, berx kavir belindir mih |
| **mihas** | şehê hesinî ku pê hespan tîmar dikin |
| **mihlet** | demek xuya ku ji yekî re tête dayîn. Me çar roj mihlet da wî. |
| **mihsik** | pêlav, şimik |
| **mihtac** | hewce |
| **mij** | mijik, buxa ku ji ewran dadikeve rûyê erdê û tarî dike. dinê mij û dûman e. |

| | |
|---|---|
| **mijandin** | bi mêtin şîr an tiştekî ron bi zarokan an çêlekî dehban dan xwarin, mijandina zarok, mijandina berxik, mijandina cewrik |
| **mijane** | benkilawe, benê ku pê nîv li sitoyê gan girê didin |
| **mijgul** | qorrê bijangan ên jêrin |
| **mijkî** | kesê xwe û cilên xwe qirêj dikin û behna dan û gemarê jê tê. Filan mijikî bûye an behna mijikî jê tê. |
| **mijmijok** | 1. petagên hinguv ên vala, 2. celebek giya ye zarok biharê hildikin û koka wî dimijin, ronqşîrîn e |
| **mijû** | nanê kevin ku pasik digire û tama wî tê guhartin |
| **mijûl** | xerîk, bi kar li xebatekê lehîn, ez hatim cem te, tu bi nivîsandinê mijul bû. |
| **mijûlahî** | mijûlî. mijûlbun peyivîn, mijûlahiya filan bi serê min neket, nizane mijûl be. |
| **mikafat** | di ber xebatekê ve tiştê ku zêdeyî daxwazê ji yekî re tê dayîn |
| **mikare** | |
| **mikewn** | |
| **mikûs** | ser û çav, filan mikûsdayî ye. ji mikûs ve razaye. |
| **mil** | ji gurmikê heya serê tiliyan dest |
| **millet** | gel, netewe, milletê kurd |
| **milêb** | mi lêw, şên, kêriç, bêrika şeş tilî ku cotkar pê bênderê bi ba dikin |
| **milk** | erd û rez û zevî bexçe, her şîtê çandin û ber digire. Ev bexçe milkê min e. |
| **milkis** | miştek, sivmik gezik |
| **miltaf** | kesê nexweşiyê ji halketî |
| **milyaket** | fehreşte, bi çavan nayên dîtin |
| **min** | |
| **minare** | di rex mizgeftan de çêdikin, mela li ser bang dide |
| **minik** | gezû di avê de tê kelandin, ew şêrînahî dibe minik |
| **minêkar** | bînekar, mîrekar hezker, ji dilxwaz. Ez minêkar im ku te li ser vê rê bibînim. |
| **miqate** | bala xwe dan, qenc lê nihêrîn, divê tu baş lê miqate bi. |
| **miqerresî** | eksa yekî tiştek kirin. Ew miqersiyan bi min dike. |

| | |
|---|---|
| **miqewr** | bê ser li ber, binfilitî dibêjin. Salek bel e miqewr e, bi şev seyî bi roj ewr e, keç avis û bûk si'tewr e. |
| **mirandin** | kuştin dayîn |
| **mirar** | dewara ku kêr negehê û bimire li goştê wê heram bibe |
| **mirarî** | celebek gewhere di deryayê de bi der têxin |
| **miraz** | ew tiştê ku mirov gîhana wî dide ber çavên xwe û her gav minêkarê gîhana wî ye |
| **mirc** | celebek genim |
| **mircan** | babetek madene ji deryayê dertêxin, sor û şînê wî heye, jin têxin destên xwe li sitoyê xwe |
| **mirç** | dengê ku di xwarinê û ramîsanê de li lêvan tê. Mirç mirça lêvan e. |
| **mirçiqandin** | qermiçandin |
| **mirciqîn** | qermiçîn |
| **mirdik** | çermê mirov ku hişk dibe bi ser ve tê wek kepekê diweşe |
| **mirdiyaq** | mêrtag, martang ku têxin asraqan ser beştan, an nav dîwaran ji bo ku xwe bigire |
| **mirdî** | darê ku pê şaxturên ser avê dehf didin |
| **mirrik** | 1. biçûçik, meriv an dewar, hestirê mirrik. 2. serhişk, înad |
| **mirin** | dawiya jînê. Filan mir. |
| **mirî** | kesê dawiya jîna wî tê û dimire |
| **mirrmirrî** | pingirî, pirruzkirî, xeyidî u hilkişkişî |
| **mirrmirk** | celebek kelmêş |
| **mirrmirrîn** | pingirrîn, pirrûz kirin, hilkişkişîn |
| **mirîşo** | kesê her gav miriyan dişo |
| **mirişk** | mêya dîk, kelebab, mirîşka me kurk bû. |
| **mirov** | insan, kesê ku bi peyva xwe ji qorrê dehban derketiye |
| **mirovatî** | bi bav û kalan, reh û kokê nizîkbûna hev Mirovatiya min bi wan re nema. |
| **mirovok** | mirovê pîsik, ne tewa, bêkêr |
| **mirtal** | ceka ku didan ber lêdana şur. Çekên berê şûr û mertal bûn. |
| **mirûz** | pirûz, tehlî û tirşiya ku ji ruyê mirov xuya dibe. Filan bi mirûz e. |
| **misas** | darê dirêj ku pê cotkar gan dajo, serîkî wê zext û serê din lawût tê de ye |

| | |
|---|---|
| **misaxe** | korxa aş ku ard dikevê |
| **misêwa** | wek hev, em di vê yekê de misêwa bûn. |
| **misilman** | kesê dikeve ola îslamê |
| **misilmanî** | îslam bûn, misilman bûn |
| **misîbet** | boblat, bela mezin |
| **misîn** | ji baqir, tenek, axê çê dikin ji bo destmêjê |
| **mishef** | Quran, kitêba ku li nik xwedê ji Mihemed re hatiye |
| **misk** | celebek bêhna çak e, ji derya dertê û ji tiştinê din jî çar dibe |
| **miskîn** | qels, reben, bextereş |
| **misqel** | |
| **misranî** | |
| **misrî** | celebek polayê ku şûr jê çêdibûn |
| **mist** | tijîbûna her du çengan, mistek ard |
| **mistdan** | bi destan canê yekî firikandin. Bavê laş mist didin. |
| **mistkeçûn** | peyayê ku di her tiştî de wek jinan dike û dide ser şopa wan |
| **miswak** | darê ku misilman pê diranên xwe difirikînin |
| **mişar** | ji bo avdana sebze korxikên dirêje ku di zeviyê de çê dikin. Çil mişer evlegek e. |
| **mişefl** | mişebl, raste rast dirêj, ifqî |
| **mişk** | heywanê biçûk ê ku di kunên dîwaran de dijî û ji pisîkan ditirse |
| **mişkulî** | pûstikê ser çavan, kesên kêmxew, mişkûliyên wan diperçifin |
| **mişlaq** | |
| **mişmer** | tiştê ku li erdê tê dîtin |
| **mişmişandin** | bi palikandinê li tiştekî gerîn, di tariyê de min dora xwe mişmişand û lê gerîn min nedî. |
| **mişrif** | |
| **mişt** | ji dêv re tijî lê ne rût, welçeka me mişt e, yanê ji dêv re dûz difiroşin |
| **miştak** | miştik, sêzik, melkes, sirbige. miştek toz û gemara ku bi miştikê dimalin |
| **miştaxe** | cihê ku tirî lê radixin dikin mewîj. Miştaxa me di nava rêz de ye. |
| **mişweş** | nîsk |

| | |
|---|---|
| **mit** | çort, mitik, girê biçûk di bilindcihan de |
| **mitate** | raman û fikirîna pir li ser tiştekî. Filan pir mitale dike. |
| **mitirb** | gewende, yê ku def û zirnê lê dide û li ser dayîna xelkê dijî |
| **mitik** | nexweşiyeke bê eman, kolêra |
| **mitêl** | nivîn, doşek. gelt, lihêf |
| **mivro** | merezdar, kemlebat, çone an topal |
| **mixabin** | heyf, esef |
| **mixmixandin** | pelçiqandin, hûr hûrî kirin |
| **mixmixîn** | pelçiqîn, hûr hûrî bûn |
| **mixmixk** | ximximk, her du kunên bêvilan ku digehên hestî |
| **mixsî** | fillehê ku diçe Qudsê |
| **mixtar** | kehya, kefxwê |
| **mixtî** | werz, erdê ku zebeş û kelej tê de tên çandin |
| **miûzî** | kêm, netekûz |
| **miz** | renge tirş |
| **mizawir** | ne rind, qelac, tevlok |
| **mizawirî** | tevlakî, gellacî |
| **mizgeft** | cihê ku misilman ji bo nimêjê çêdikin camî |
| **mizir** | bêyom, şûn |
| **miç** | kuş, hesp guhên xwe miç kirine |
| **miçikandin** | mîç kirin, hêstirê guhên xwe mîçikandin, dimiçikîne |
| **mîçikîn** | mîç bûn, guhên hesp mîçikîn. |
| **mîl** | singê ziravê ku hekîm berdide çavên nexweşan |
| **mûmar** | êşeke ji serê tiliyê çar dibe, qîlbaşi |
| **mîna** | wek, nola, ew jî mîna min dike. |
| **mîr** | kesê ku di erdimekê de xwediyê gotina dawiyê be, bi serê xwe be |
| **mîrate** | heyîna ku piştî mirî ji mirovên wî re dimine |
| **mîratxwer** | kesê ku mîrat pê dimîne. Filan rnîrstxwerê meye. |
| **mîrav** | kesê ku parvekirina avê bi destde be. Filan mirovê gundê me ye. |
| **mîrkût** | daraoqî, pê dan û savar tête kutan |
| **mîz** | ava ku di qamûşê mirov re tê |

| | |
|---|---|
| **mîzega** | bi mana ziraviya mîza gê, ava me îro bûye mîzega, yanê wek mîza ga hindik û zirav tê. |
| **mîzel** | mîzek, kelmîz, kesê ku di xew de bi xwe de dimîze |
| **mîzesrînek** | hatingirtina mizê, mîz lê anqîn |
| **moç** | celebek kodên pîvanê, karma seh |
| **moçik** | kada pîvanê ya biçûk |
| **made** | pehlewanê jêhatî |
| **mole** | |
| **momin** | destmala rengîn ku jin bi serê xwe de dikin |
| **mon** | necamêr, nemerd |
| **monc** | pêlên raman monceke baş hatê, moncekê pîs hatê. |
| **mor** | rengek, navê darekê as |
| **moran** | bi germiya royê hilma ku ji erdê radibe. vajoyî mijê ku dijor de dadikeve |
| **morik** | miroyên kun ku jin bi tave dikin û têxin sitoyê xwe |
| **moşene** | dikana ser negirtî ji depan li ser tiştên firotin, beste, yê ku lêdide |
| **mot** | motî doşaw. dims |
| **motac** | mihtac, bi hewce |
| **mofirk** | mehrûk, mehrî movik, mofirkên piştê mofirkê tiliyan |
| **moz** | moza sor mêş sor, moza gan, celebek mêşên xurtin biharê dikevin bin zikên ga û hespan |
| **mozik** | golikê parone ji dû salê berjêr |
| **mazik** | kurê jina mirov |
| **mazkirin** | reva gan ji ber mazê |
| **mû** | tayekî por, purta bizinî |
| **mûçink** | mûnçik, ew tiştê ku pê mûyan ta bi ta dikêşin |
| **mûjank** | mûjelang, bijangên jorîn |
| **mûm** | benşima, çira ji dan |
| **mûnc** | pelm, qup, lep |

# N

| | |
|---|---|
| **na** | no, na!  Ez nadim, na ew nehat. |
| **nabekar** | bi kêr nehatî, serserî |
| **nadir** | tiştê ku wek wî gelek hindik be |
| **nadîde** | ew çend baş ku wek wî nayête dîtin |
| **nafind** | nîvek. navrêş, merkeş |
| **nafs** | |
| **nal** | jolê dewar. Min hespê xwe nal kir, nal û nihêl. |
| **nalandin** | bi nalîndan, me diya wan nelend. |
| **nalbend** | kesê ku dewar nal dike |
| **nalbendî** | karê nalbendan |
| **nalenal** | nalîna bi ser heve, bê atlî û bi dengekî bilind. Dengê nal nala wî em nekirin xew. |
| **nalîn** | dengê ku ji ber êşê ji mirov tê. Nalîna wi dilê mirov diperitîne. |
| **name** | reşbelek |
| **namidar** | bi nav û deng |
| **namîlke** | kitêb |
| **namûs** | rûmet û şerefa ku li pê navê pak digehê mirov |
| **namûskar** | kesê xwedî namûs, yê ku ji riya namûsê naqete |
| **nan** | ew xwarine ku ji ard dibe hevîr û hevîr li ser sêlê, an di tendûrê de, an di firnê de dibe nan. Bi nan û xwê, bi nan û zik. |
| **nanda** | kesê ku bi dayîna nan hatiye naskirin |
| **naneder** | kesê hergav derî mala xwe nan dixwe. Filan naneder e. |
| **nanik** | 1. celebek pincar, 2. kilora hingûv, nanika hingûv |
| **nangîr** | erdê ku ceh û genim tê de gelekî baş dibe |
| **nankor** | kesê qenciyan ji bîra dike |
| **nankorî** | qencîbirî |
| **nanpêj** | kesê nan dipêje |
| **nanwerd** | pêxwarin, xwarinên ku bi nan re tên xwarin |
| **napik** | pencên teyran nînokên wan ên tûj |

| | |
|---|---|
| **narinc** | celebek meywe wek porteqalan, lê tehle miz, ji qaşikên wan rîçalên hêja çê dibin |
| **narûce** | rengê narinc |
| **nas** | kesê ku mirov wî dizane, filan nasê min e, ji min re nas e, ez wî dinasim. |
| **nasîn** | nasî, nas kirin, zanîn |
| **nav** | nav lê kirin, nav lê dan, nav tê dan, bi nav kirin |
| **navandin** | bi nav kirin. Min lawê xwe bi navê wi navand. Binavîne. |
| **navdar** | bi nav û deng |
| **navdarî** | bi nav û deng bûn |
| **navdaş** | |
| **navder** | mecala di navbera deriyê du odeyên li hember hev |
| **navdeşt** | deşt an rasta di navbera du çiyan de |
| **navdil** | dil, gurçik, kezeb bi hev re dibin navdil |
| **navinçî** | navhinçî, kesê ku dikeve navbera du neyaran û dixwaze wan li hev bîne |
| **navêş** | qolinc, êşa ku ji ber sermayê dikeve nav an şikê mirov |
| **navik** | nêvik, di nîvê şikê mirov de, cihê ku dema bûnê tê birîn û girêdan |
| **navkêl** | navteng, di tala navikê rê çarmedar, navkêl zirav |
| **navmal** | celebek raxer, ji rîs û pembo şê dikin û digirin ser nivînan |
| **navmalî** | jin û pîrekên di nav malê de |
| **navno** | kesê ku navê wî bi nebaşî dertê |
| **navran** | nîveka derpê, navbera her dû delingan, nava her du ranan |
| **navro** | navbera nîvro û êvarê. Vê navroyê min dil heye ku ji malê neçim. |
| **navrû** | navbera du çeman |
| **navser** | 1. navçav. nav sera çiyê, 2. ji pêncî salî berjor filan navser bû. |
| **navteng** | 1. navkêl, 2. binzika dewar, navtenga hesp baş bişdîne. |
| **navtêdan** | bi gotinê dildana yekî. navtêdan ji desthilanînê ye. |
| **nawîs** | di bin erdê de mezelên ku ji bona miriyan çê dikin |
| **naxir** | garan. keriyê dewar ku dertê çolê |
| **naxirqewan** | di dehê meha çille de ji ber serma yê dewar nikare here çolê |
| **naxirvan** | kesê ku diçe ber naxirê |

| | |
|---|---|
| **naz** | delalî. filan nazê xwe li min dike. |
| **nazbalgih** | zemberîşk |
| **nazdar** | kesê ku naz û delaliyan dike |
| **nazdarî** | naz û delalî kirin |
| **nazenîn** | keça ku ber deng û nexmeyeke wê nazek be |
| **nazik** | zirav. tenik. şêrîn, xweşik |
| **nazî** | nazkirin, filan naziyê xwe li min dike. |
| **nebanok** | çi diya ku ji çêliyên xwe nabane, nedilovan |
| **nebatî** | celebek penîr |
| **nebekar** | qûnde, qehpik |
| **necimîn** | lecimîn |
| **nefel** | giyayê bi gul û kupik, nîzîkî yoncê ye |
| **nefs** | behn, hilm, me nefesek girt. |
| **neh** | jimara nehan, 9 |
| **nehek** | neh rojên berî cejna qurbanê |
| **nehil** | cihê ku kevroşk ji bo razana xwe dikde û çê dike |
| **nehwirandin** | bi dengekî nizim û zîz ji xwe re stran |
| **nehwêt** | not |
| **nehf** | fêde |
| **nehs** | bê yom |
| **neks** | nexweşiya ku ji ber serma girtinê, ji kezeba sor çê dibe |
| **nemaze** | xasma, yek jê |
| **nemêr** | kesê ku mêraniya wî kêm bê tevger wek jinan |
| **nepax** | aletê ku pê tiştan dinepixînin, nepaxa lastikên otomobîlê |
| **nepenî** | nependî, nehatî, payîn, Ew xanî nepenî ye, |
| **neperûşk** | nînokên heywan ên zirav û tûj, neperûşkên pisikê |
| **nepixandin** | tijî kirin, dagirtin û werimandina tiştekî ji hemd zêde, min lastîkên otomobilê nepixandin. |
| **nepixîn** | tijî bûn, werimîn, min nok xwarin û ez nepixîm. |
| **neqandin** | bijartin, çê û xerab ji hev veqetandin |
| **neqeb** | cihê ku te re derbas bî, navber. Nekeve neqeba me. Ez di neqeba her dû keviran re çûm. |

| | |
|---|---|
| **neqepûş** | jina ser porkirî |
| **neqirandin** | ciq, riq li tiştekî dan û deng jê derxistin |
| **neqr** | teşta kûr |
| **neqrîsk** | Nexîsk, êş, tivanc |
| **nerm** | ne hişk, wek pembo nerm. |
| **nerme** | nîv nerm, nîzîkî nerm. Ev erd nerme ye. |
| **nermijandin** | di avê de nerm kirina tiştekî. Me lowik oermijendin. |
| **nermijîn** | di avê de nermbûn |
| **nermik** | nermika guh helîlka guh |
| **nerx** | biha, qîmet. Ev tişteki bê nerx e. |
| **nesîb** | tiştê ku dibe para mirov, bê ked û heq, par, hise |
| **neştel** | |
| **neşter** | niştir, pê xwînê ji mirov berdidin |
| **neşxor** | xwarina ku ji ber dewar dimîne |
| **netebitî** | kesê nikare xwe ragire, sivik |
| **netekin** | ne vala, ji bo xaniyan tê gotin. Ev xanî netekîn e. Yanê ji cinan ne vala ye. neskûn |
| **netewitî** | bê sebir, xwe ranegirtî |
| **netirk** | 1. bazin û gustîrên zivîn ku jin têxin destên xwe, 2. navê qulcîçeqekê |
| **nevî** | kurê kur, keça kur, kurê keç, keça keç |
| **nevîçirk** | keç û kurên nevî |
| **nevîsî** | kurê ku kurê mirov ji xwe re dike law |
| **newal** | nihal cihê ku baranê, an avên hişkeliyan kûr hiştiye û îro av tê de naçe |
| **newq** | navkêl |
| **newîrandî** | dema jin avis dibin û dilê wan diçe hin xwarin. Filan ji newîraniyan dike. |
| **newroz** | cejna kurd û êraniyan, rojên 21,22.23 ji meha adarê |
| **newt** | nod, mot, jimara 90î |
| **nex** | benên sitûr ku ji heriyê çê dikin |
| **nexo** | |

| | |
|---|---|
| **nexş** | çîn, nexşên filan jinê geleki hêja ne. |
| **nexweş** | ne rihet, ku ji ber nexweşiyê dikeve nivînê, êş pêketî |
| **nexweşî** | êş, derd, merez |
| **ney** | celebek raz e, wek bilûrê, lê kurt e |
| **neyar** | ne dost, dijmin |
| **neyarî** | dijminahî |
| **neyîn** | cînebûn, heyîn û nevîn |
| **neynik** | sindoqê pişt dermankirî ku mirov tê re xwe dibîne, ayîne, mirêk |
| **neynok** | ninok. hestiyê di serê tiliyên destan û pêçiyên lingan de |
| **nezan** | kesê bîrnebir, ne fêr |
| **nezanî** | nezan bûn |
| **nezir** | tiştê ku dan, an kirina wî di nava xwe û xwedê de dibêjî ku nexweşê min rabe ezê beranekî ji bo xwedê jêkim |
| **nêçîr** | nevçîr, seyd, raw |
| **nêçîrvan** | kesê ku diçe nêçîrê |
| **nêk** | |
| **nêm** | kêm, ava tîr û zer ku ji birînan tê |
| **nêr** | hemî tiştê ne mê re tê gotin, mêr mêr e. Çawan ku mirov û dehbeyan nêr û mê hene, bêjeyan jî mêr û mê hene. Wek; xanî mêr e, mal mê ye. |
| **nêrmok** | ew mêrê ku ji meyîza nêr bûnê bê par e |
| **nêrmokirin** | du serên darekî yek tûj û yê din kort kirin û serê tûj dî ê kart de bi cih kirin, lolep kirin |
| **nêrgîz** | celebek çîçekên biharê di mêrgan de dibin, gelekî bi çîçek nastikan dimînin û behna wan xweş e |
| **nêrî** | nêrê bizinê, nêriyê pîvazan, xilfê ku li nîveka pîvazê dikeve û tov digire, boq |
| **nêrîn** | nêrtin, çavdan, li min binêre wî mêrî |
| **nêrnêrî** | çav mêrî, min mêrmêriya wî kir. |
| **nêz** | ne dûr, nêzik. Ew gelekî nêzî me bû. |
| **nêza** | birçîne. ew ji nêza mir. |
| **nêzîk** | pir êş, ne dûr |
| **niçandin** | bi îşaretê yek ji tiştekî hişyar kirin, min bi çavan niçandê zû bîr bir. |

| | |
|---|---|
| **niçik** | çînên serî tûj ku di keviya tiştekî de, sihana me bi niçik e. Kumê min bi niçik e. |
| **nifir** | nefsîn, ji bo yekî ya neqenc xwestin. Ez tu nifiren li bejna delêl nakim. |
| **nifsî** | lawê xamê reng gewr e |
| **niftik** | kibrîta ku vêdixin |
| **niginandin** | mar kirin, min ew sened niginand. dê biniginîne. |
| **nigîn** | mora ku nav li ser tête nivîsîn |
| **nihan** | niyan |
| **nihandin** | |
| **nihêrtin** | nêrîn |
| **nihêt** | kevirê ji bo avahiyê çêkirî |
| **nihk** | nehk, sinegberê bi nikul ku pê wûnana rîs çê dikin, vediçinin |
| **niho** | niha, nika, vê gavê |
| **nihriz** | hesinê şûran, celebek hesin |
| **nihrî** | sipa avê, di nîveka ava çeman de cihê ku xurt dimeşe |
| **nijde** | çûna birek mêr bi ser neyar de ji bo xisasa war |
| **nijdevan** | kesê ku diçe nijdê |
| **nijinandin** | bê girêdan an tiştekî ku bigirêdan ser hev û bi hev sekinandin. Me devê şikeftê bi kuçan nijinand, em dê çilo binijînin, wan nijinî. |
| **nijinîn** | dan ser hev, li ser hev danîn û bilind kirin |
| **nik** | cem, ba, bal. hinda, Ew li nik min dihat. |
| **nikar** | dor, hêl, alî, çarnikar, çarmedor, herçar hêl |
| **nikarok** | di çiyan de erdê bi kils ku axa wî gewr e |
| **nikl** | awayê stranê, nikla xelkê Botan xweş e. |
| **nimandin** | ravekirin, nişan dan, |
| **nimandan** | di avê de nerm kirin. Nokan di avê de binimîne. |
| **nimayîş** | bi derketina leşker tev çek û posatên xwe bi intlzam meşîn |
| **nimêj** | ji xwedê re serî danîn û lave kirin, nimêja sibê ya nîvro ya înê, ya cejnê |
| **niqar** | celebek kevirê nerm |
| **niqare** | |

| | |
|---|---|
| **niqitandin** | niqte bi niqte rijandin |
| **niqitîn** | dilop dilop rijîn |
| **niquçandin** | bi destan an lingan yek şiyar, an serwext kirin. Haya wî li wî tine bû. Min bi destan niquçandê. |
| **niquçk** | bi gihandina lebatekî ji laşê re, serwext kirin. Niquçkan li min dide |
| **niqul** | bihivên şekir kirî |
| **nisêb** | erdê ku dikin bajon, ava dana wî.Me erdê xwe nisêb kir. |
| **nisilandin** | parzinavdin |
| **nisilîn** | hatin parzinîn |
| **nistî** | cilîsim |
| **nisa** | şîraya genim |
| **nişadar** | nişakirî |
| **nişk** | niş, bê hay û xeber. Di nişka ve hat. ji nişve çû. |
| **nişm** | nerm, bînfireh, helîm |
| **nişmî** | nermî, bînfirehî, hilm |
| **nişûv** | nişîv, serejêr, dema li nîvê kaşekî bimînî binhêl dibe. nişûv û serhêl dibe hevraz. |
| **nivandin** | nivistandin. Kirin xew, wî zerokî bitiivine. |
| **nivistin** | ketin xew .Ew zû nivist. |
| **nivişt** | nivîsandina ayetan ji bo êş û nexweşiyan, mela niviştan çê dikin |
| **nivîşk** | rûnê ku nuh ji dew dertêxin, berî helandinê |
| **nivîn** | lat, doşek û mitêlên ku mirov tê de radizê |
| **nivîsandin** | nivîsan kirin. Min jê re reşbelekek nivîserid. |
| **nivîsîn** | tiştek nivîsîn |
| **nivz** | |
| **niwîser** | nivîsevan katib |
| **nixumandin** | ser parkirin, germ kirin |
| **nixumîn** | ser po bûn û germ bûn |
| **niyav** | deng pêketin |
| **nizar** | erdê ku rojê nabîne |
| **nizim** | niviz, daketî, li jêr |
| **nizimandin** | nizim kirin |

| | |
|---|---|
| **nizmîn** | kesê nizim, cihê nizim |
| **nîk** | bişkova bi nikul ku jin têxin guçê xavik û dawên xuftanan |
| **nîkil** | |
| **nîlûfer** | nîlûper, nîl û belk, navê cîce kek gewr û bîn xweş |
| **nînna** | strana ku ji zarokan re tê gotin |
| **nîr** | darê ku têxin sitoyê de war û pê cot dikin |
| **nîrik** | |
| **nîsan** | navê meha çaran |
| **nîsk** | celebek zad e dikin çor be, şorba nîskan |
| **nîsko** | menqûr, ezman |
| **nîşan** | xweya bellû. tiştê ku didin xuya kirin. Me avêt nîşanê ji min re nîşan ke. |
| **nişandar** | kesê ku baş davê nîşanê |
| **nîsakirin** | ravekirin, nimandin |
| **nîşank** | |
| **nîv** | tiştekî bikî du paran, her parek jê nîve |
| **nîvco** | nîvçe, ne temam, te karê xwe nîvco hişt. |
| **nîvekîr** | kesê bêkêr |
| **nîvî** | yek nîv |
| **nîvkose** | kesê riha wî firk |
| **nîvro** | nîvê rojê, dema ro tê |
| **nîvê** | ezmên |
| **nîvşev** | nîvê şevê |
| **no** | xurt, har, dijwar. Derdê dilan pirî no ye, ne bi şev e, ne bi ro ye, wek agirê di çilo ye. |
| **nobe** | dar |
| **nobedar** | kesê dora xwe digire |
| **nogin** | golika du sal e |
| **nok** | celebek zad jê gelek xwarin çê dibin, nok çû bajêr bû lewlewî. |
| **noq** | lam, bin av |
| **noqar** | gemiya bin av |
| **nozde** | jimara 19 |

| | |
|---|---|
| **nû** | nuh, new, ne kevin, nehatî şûxilandin |
| **nûbar** | newbar keça berzewac, dewara berbar |
| **nûjen** | tiştê ku ji nû ve tê jendin |
| **nûsikandin** | zeliqandin nûsikîn pêve zeliqîn |
| **nûxurî** | zarokê ku jin berê pêşin tîne |
| **nûzîn** | hespa ku nû tê zîn, an keça ber zewac |

# O

| | |
|---|---|
| **o** | edata teecib, o! tu kînga hatîş |
| **obe** | cihê ku eşîr konê xwe lê datîne |
| **ober** | |
| **ocik** | nava zik |
| **ode** | mezel, cihê rûniştina mêvanan |
| **oks** | erdê bi avzên ku mirov pê de diçe xarê. |
| **ol** | rê, dîn, ola mihemed, ola zerdeşt, bi ol, bê ol |
| **olaq** | bergîrê ku di rakirina baran de dixebitinîn |
| **216** | |
| **olî** | tek mezela ku li ser xanîkî ava dikin |
| **olparêz** | kesê ku çak bi rêzana ola xwe digire |
| **ornag** | çişît, celeb |
| **ox** | edata dilxweşî, ox ev tişt bi dilê min bû. |
| **ox** | erdê ber malê. axê me ji yê hemî gundiyan çaktir e. |
| **oxur** | xweşiya ku li rê yekê hêvî dibe, an çûna bi rêyekê |

# P

| | |
|---|---|
| **p** | |
| **piç** | hebek, hin, çîçk, kerî, piçek nan bide wî, piçekî raweste, piç bi piç. têr bû miç |
| **piçûk** | kiçik, biçûk, hûrik |
| **pidî** | pidû goştê dor diranan |
| **pij** | gij, vekirî, bê dûzan. Çûkê baskên xwe pij kirin û di hewayê re xwe tezand. |
| **pijandin** | |
| **pijik** | serê hejikan ê gijik |
| **pijiyayî** | |
| **pijûn** | xurt. li ser qewta xwe, newestî, wî berdinê, hîn ew î pijûn e. |
| **pif** | bayê ku ji dev dertê, wî pife agir kir. pif ke. |
| **pifik** | pifa ku ji dev tê der |
| **pifkirin** | ba ji devê xwe derxistin |
| **pihêt** | xurt, saxlem, pihêt pê bigire. |
| **pil** | |
| **pilçok** | bilçik, dema çilka baranê dikeve nav avê li ser rûyê avê dipengize û dibe bilçik, pilçoka baranê |
| **pilik** | xûşka bav û dê met, xaltî, pilika min hat. |
| **pilikza** | pûrza, kurmet, bixaltî |
| **pilind** | dûvik an qûna teyran, pilinda mirîşkê |
| **pilm** | mad, mirûz, filan her bi pilm e, te ji bo çi pilmê xwe kiriye? |
| **pilor** | pelor, hewdel, tevlîhev, xwarineke ji nîsk û savarê çê dikin |
| **pilpilî** | Pinpinî |
| **piltûr** | met û xaltiya bav û dê, pilûra min, meta bav an diya min |
| **pilûşk** | çermê ser çavan |
| **pincar** | giyan ku tên xwarin |
| **pind** | rawesteka teyr, darê ku ji bo veniştina teyran çê dikm |

| | |
|---|---|
| **ping** | bersing, darê ku bi ber sing de dikutin. her singekî pingek heye, kesê ku xwe dinepixîne. Wî xwe ping kiriye. |
| **pingar** | pingav, pengav, ava ku naherike û dicive ser hev |
| **pingirandin** | an bi xeydê, an bi pesnê yek nepixandin. Filan bê sebep pingiriye. |
| **pingirandin** | ji xeydan an ji dilgirî nepixîn |
| **pinî** | leke, qirêj, keçelo pinî, pinî, pîvaza ser mezin î hevalê sola min î, pinî li cilên min ketine. |
| **pinz** | |
| **pir** | rêya ku di ser çeman re çê dibe, pira ser ferêt |
| **pirr** | ne hindik, zor, gelek, gotina pirr, bayê kurr. |
| **pirranî** | pirrî. pirr bûn, pirraniya kurdan kurdmanc in. |
| **pirrbêj** | kesê ku pirr dipeyive, gevez, pirrgo |
| **pirç** | pûrt, mûyên ku bi laşa mirov û hirçan ve wek hirçê bi pirç |
| **pirrêş** | kesê ku êşên wr pirr, sîvar, belengaz |
| **pirêze** | firêze, firaze, şûna zadê ku nuh tê çinîn. çopa kira mirov, pirêza genim, pirêze wî ne ewçend baş e. |
| **pirnisîn** | navbera xew û hişyariyê, di cihê xwe de pirnsiye. |
| **pirrparr** | celebek pincarê avî ye, çend celeb xwarin jê çê dibin |
| **pirpire** | |
| **pirrpirrik** | pinpiniya biçûk |
| **pirrpirrok** | polên biriqok ku bi cilên jinan ve didirûn |
| **pirrpirs** | kesê ku pirr pirsan dike |
| **pirrpiş** | sipiyên depan, beq, texte kelesi |
| **pirpizîk** | |
| **pirs** | gotin, pirsîn. min pirsek bû da wi pirsa xwe bi min xist. |
| **pirsandin** | |
| **pirsiyar** | kesê ku dipirse |
| **pirsiyarî** | pirs kirin, pirsiyariya wî tiştî ji min dibe. |
| **pirsîn** | pirs kirin |
| **pirispan** | pîne, min sola xwe pirispan kir, sola bi pirispan |
| **pirtal** | pertal, cil û caw, çerçî pirtalê xwe firot. |

| | |
|---|---|
| **pirtik** | perçên caw ku ji ber birîna cilan dimînin û ji pîneyên biçûk pêve bi kêrî tiştekî nayên |
| **pirtikandin** | wek pirtikan şîtirr şîtirî kirin, vegijgijandin |
| **pirtikîn** | di cihê xwe de vegijgijin, ricifîneke ne adetî û zêde |
| **pirûsî** | pirûsk an pirûskên ku di nav xweliyê de dimînin xişor |
| **pirût** | kesê ku firaxan ji axê çêdike, firaxên ku ji axê çêdikin ev in sawîl tasika avê, xirafok, sirahî, kivî; firaqa mot, dims, merken; keşkê, kodik; sihen, kasik; sînî, hincanok; legan, hincan; teşt. qala; sêl, qados firaqa ku şîr têde didoşin, dîz; dîzik |
| **pirzik** | pizikên ku ji laşa mirov dertên |
| **pis** | kurr, law, pismam, kuram, kurap, filan pisê roja xwe ye. |
| **pisik** | pisîk, pising, kitik |
| **piskule** | piskula kumê sor, piskulên ku jin têxin porê xwe, bengulî |
| **pismam** | kurê ap, kurê am, pismam û dotmam |
| **pispan** | |
| **pispis** | deng li pisîkê kirin |
| **pispisandin** | dev xistin ber guhên hev û bi dizî peyivîn |
| **pispor** | kesê ku di kar an xebatekê de ji hemî kesan jêhatîtir be. Filan bijîşk pispor e, yanê ji bijîşkên mayî zanatir e. |
| **pistîn** | kurepist, peyva dev di ber guh de |
| **pişavik** | perçê sabûnê yê biçûk, maşik kirtik |
| **pişik** | piş, kezeba sor |
| **pişk** | eynen, tev de, kurê filan pişk li bavê xwe çûye. |
| **pişkandin** | yek bi piskîn dayîn |
| **pişkîn** | bi erebî Etis jê re tê gotin, tûjiya dermanê germ mirov dipişkine. |
| **pişkamok** | navê lîstikekê, ku bi zanîna jimarê mirov tê de serdest dibe |
| **pişkul** | ziblê mî û bizinan |
| **pişrûk** | ard an ax an çi tiştê ziwa hinek av tevlê be û bi heve ve mûsike. Kopekê dikin pişrûk didin hespan. Av û cîmoto û xêjil dibin pisrûk |
| **pirşrûn** | savara hûr |
| **pişt** | navmil, filanî pişt pehn e, li pişt rabûn, li pişt sekinîn, pişt şikandin, pişt girtin, pişt germ kirin |

| | |
|---|---|
| **piştben** | piştbihn, ew tiştê ku li pişta xwe dipêçin, piştbihn, piştik, şûtik, piştpên, çar |
| **piştdan** | piştgirtin |
| **pişte** | |
| **piştek** | dema dîwarek an darek dike bikeve tiştê ku didin ber |
| **piştî** | barê ku hildigirin ser pişta xwe. Çiyayî zadê xwe bi piştiyan dikişînin |
| **piştî** | paşê, pişti vê yekê nema pê bawer dibim. |
| **piştkî** | bi piştê |
| **piştlierdê** | jina bi mêr, ji peyayê qels û bindest re jî tê gotin |
| **piştlinq** | tiştê ku mirov li pê xwe dihêle, mêrat |
| **piştmaz** | hestiyê di nîva piştê de, ji sito heya bi dûvik tevayiya wan navikan |
| **piştmêr** | kesê ku li pişt mirov disekine û piştê diparêze |
| **piştpehnî** | kulpar, navbera eşk û pehnî, wî piştpehniya xwe bi me ve kir û bazda |
| **pişûşkîn** | |
| **pit** | pitê, kiçik, biçûk, ji keç û jianan re tête gotin. Pitê hinek av bide min. |
| **pitapit** | pitepir, di ber xwe de û bi xwe re peyivîn, ev peyva ku nayête bihîstin. Te çi pitepit e. |
| **pitat** | pirgo, geveze, pitatiya filên tistekî ecêb e. |
| **pitek** | |
| **pitî** | biçûk, ji bo kur û lawan tê gotin. pitiyê min welê neke. |
| **pitpitok** | kesê ku pirr pitapitê dike |
| **pitût** | tiştê kot û kevnar û peritî |
| **pixk** | ew tiştê ku pê zarokan ditirsînin |
| **piyam** | |
| **piyan** | tasika avê, kasika şerabê, piyana xeyam |
| **piyano** | aletê sazbendî |
| **piyar** | dilovan, dilbirehm, xwedê piyar e. |
| **pizan** | pizang, pizdank, tûrikê ku biçûk ê dewar tê de di zikê dê de, pizanê çêlekê |

| | |
|---|---|
| **pizik** | pirzikên ku ji lasa mirov dertên |
| **pizivandin** | lebitandinek hindik |
| **pizivîn** | hindik lebitîn, kurm dipizive |
| **pizpizik** | lûtika ku ji qamîs çê dikin |
| **pizî** | maldoxîn, cihê ku doxînê tê re dikin |
| | pizîzang berçil, berçînsk |
| **pizoz** | |
| **pizûr** | pior |
| **pizrûk** | barana gelek hûr, pizrûkên baranê tên. |
| **pî** | mil, ji gurmik heya bi tiliyan, pîdan ber pişt dayîn, destgirtin |
| **pîbik** | |
| **pîçik** | savara |
| **pîj** | çi perçeyê zirav û sertûj ku ji dep, dar an hesin çê dibe |
| **pîjik** | kisofis, giyake tê xwarin û di nava wî de tiştekî wek pembo heye |
| **pîl** | mil tevî hestiyê binpal, pilek goşt, pîl, teneke |
| **pîlewer** | kesê ku bi çêkirina tiştên teneke mijûl dibe |
| **pîn** | cihê ku mirîşk tê de radizên, an lîs dikin |
| **pînc** | bêbav, bav ne xweya |
| **pîncik** | pijikên ku ji dep û daran radibin, goştê mirî ku di doraliyê mînakan de radibe |
| **pîne** | perçeyê caw an çerm ku li cihê çiriyayî dikeve, cilê bi pîne, sola bi pîne |
| **pînedûz** | kesê ku solan pîne dike |
| **pîpikandin** | pir dagirtin, tije kirin, min berîka xwe ji mewîjan pêpikand, rapîpikandin |
| **pîpik** | zimanê tûtikê ji pelaxti na qaşikên hin celeb dar çêdibe, pîpikê zirnê |
| **pîpok** | celebek bilûrên kurt, mey |
| **pîr** | pirr sal, di ser şêstî re, kevn û riziyayî, pîr; seyda, mezin, rênas |
| **pîrejin** | jina pîr |
| **pîrek** | jin, pîreka min, ev karê pîrekan e. |
| **pîrevok** | pindepîr, pindir |

| | |
|---|---|
| **pîroz** | pir roj, xêrxwestin, cejna te pîroz. |
| **pîrozî** | cejn an zewac, an tişte kî yekî pîroz kirin, em çûbûn pîroziya filankes. |
| **pîrozang** | ji bo ku zarok çavinî nebin nivişt kevir û hesinên ku bi mil, pişt û serê wan ve dikin |
| **pîroze** | teyrekî wek kevokê |
| **pîrozvan** | kesê ku diçe pîroziya hinekan |
| **pîs** | ne paqij, qirêj kirêt |
| **pîsik** | kesê qirêj, bêkêr, ne camêr |
| **pîsî** | kirên pîs, nizam ev pîsî ji kê derketiye. |
| **pîspan** | kesê destkira wî ne paqij |
| **pîsû** | bêsû, şewata paç. Behna pîsû  tê. |
| **pîş** | hiner, havil pîşe sen'et, xebat |
| **pîşekar** | Sen'et kar, filan pîşekerekî baş e. |
| **pît** | tîp, herf, elîfbeya kurdî 31 pît in. |
| **pîşpîşe** | kesê ku pir qelew ku bi dijwarî bêhna xwe digire û dike pîsepîs. di kar û xebata xwe de baş jêhatî. Filan pîşpîşekî mêran e. |
| **pîvan** | pîvana zad, pîvana caw |
| **pîvandin** | bi pîvan dayîn |
| **pîvaz** | piyaz, celebek keskayî,ter û hişk di gelek şîvan de tê xwarin, nanê garis zîllikê pivazê |
| **pîvazî** | pîvazên dagirtî |
| **pîvok** | giyak e, koka wî wek findiq girover e û bi terî tê xwarin |
| **pîx** | kevî, rex, pîxe gund tev de werzîn |
| **pîzpîzak** | çûkek spî û dûvdirêj e |
| **po** | tayên dezge ên li ser pehniyê |
| **pojan** | porjan, celebek giyayê çolê |
| **pol** | polik, diravên kaxez polê poste |
| **pol** | serpil, gurmik |
| **pola** | hesinê xurt, destên wi wek pola ne. |
| **palqe** | nokên çolê |
| **ponijandin** | ji zewan serî xistin ber, me ew ponijendin. |

| | |
|---|---|
| **ponijîn** | ji bê xewî serî ketin ber. Ez diponijim. |
| **pop** | gurmit, pînçik, poztelîs, ev depi pirpope divê rende bibe |
| **porr** | pirça serî, porê wî sipî bûye. |
| **porang** | boraxe, qûna ku di ber çeman de dibe kevir û zû diherike |
| **porik** | kesê por pir yê ku porê xwe nabire, porqij |
| **porkirin** | sergirtin, tiştekî serpas parkirin |
| **posat** | hevalçek, tevayiya sext sile, fîşek, ot û sirêç. Me çek û pasa tên xwe hilgirtin. |
| **post** | çerm, kavil postê beran, postnişîn |
| **postal** | postar, sal, pelav, ew pêlava ku ji post dibe |
| **poş** | |
| **poşeker** | |
| **poşî** | pîşo |
| **poşî** | pûşî laçika reş ku ji digirin ser çavên xwe |
| **pot** | cil û kincên kevin û peritî |
| **potandin** | çêla rebenî û bextereşiya xwe kirin |
| **potik** | pacikê ber destan |
| **poxik** | gulik û gulbendên ku keç bi xwe ve dikin |
| **poxîn** | kepek, ardê qewirandî |
| **poz** | kepo, difin, poz, seriyê paşîn, pozê çiyê |
| **pozberan** | kesê ku difnê wî wek difnê beran |
| **pûç** | vala |
| **pûk** | barîna berf an baranê tevî ba bi xurtî |
| **pûkandin** | bi gotinên kêm û zêde xwe tirsandin. Filan belaş pûkê dike. |
| **pûke** | berfa hûr û hişk, bi şev li me bû pûke. |
| **pûnc** | zep, min pincek li serê wî da. |
| **pûngal** | merkez, cih, hêvî, wî pûngala xwe di Cizîrê de çê kir. Pungala wî di vî bajerî de nîne, ev jî ji me re pûngalek e. |
| **pûnk** | giyakî bêhn xweş e, di ber avê de şîn dibe. mar ji pûnkê hez nake di ber bêvila wî de şîn dibe |
| **pûrr** | porang, dema qûm dibe kevir jê re pûrr an pûrrang tê gotin |
| **pûrisandin** | devê xwe bê fesal dagirtin, ew nanê tisî pûrisand. |

| | |
|---|---|
| **pûrisîn** | veliqitandina ser ser hev, qermiçandin. Ezê wî vepûrisînim ser hev, ango ezê wî bigivêşim û bigermêçim. |
| **pûrt** | pirç, porr |
| **pûrtikandin** | pûrt jê rakirin, wî mirîşk pûrtikand, min ew pûrtîketid, yanê malê wî jê sitand. |
| **Pûş** | giyayê hişk, pûş û pelax |
| **pûşk** | celebek giya ye, riçên wî wek mûmê tête vêxistin |
| **pût** | senem, ew tiştên ku xelkê xuda nas dikirin |
| **pûtparêz** | kesên ku bawerî bi pûtan tanîn |
| **pûtxane** | cîhên ku pût tê de datanîn |

# Q

| | |
|---|---|
| **qabûr** | kûrikê avê ku hêla jorîn çikestî |
| **qacuck** | tasa avê ku ji axê çêdikin |
| **qad** | meydan, mêrê çê, ket qadê |
| **qade** | nanê ku di rûn de sor dikin û hişk dibe |
| **qadik** | xwarineke, penîr têxin nav tewekên nan û di nav sêniyê de têxin firnê, burek |
| **qadirî** | sihana ji paqir |
| **qaf** | qat, tot, kilox, navçava serî, ji navçava gir an çiyan re ji tê gotin |
| **qafik** | kundirê ku di nîvî de dev jê vedikin û wek heskan di kargehan de pê mot û şîre yê têxinê, çi kundirê bê avê ji bo tiştekî bête şuxulandin. qafikê ku zarokan li ser didin rûniştandin |
| **qafî** | qafiya şîrê |
| **qafîbêj** | kesê ku gotinên xwe bi qafiye dibêje |
| **qafqiloz** | firaqên ku ji axê çêdikin, lê çînî |
| **qafû** | dar û gemara ku bi lehiyê re tê |
| **qajik** | celebek benîşt e, rengê wî cûn e û bi cûtinê sipî dibe |
| **qal** | zîvê helandî paqij ji hemî madenên helandî re tête gotin |
| **qalan** | Dirav an tiştê ku ji bo zewacê ji mala bavê bûkê re tête dayîn |
| **qalax** | serqînê ku ji bo şewatê pêkhatî |
| **qalib** | ew aletê dûzana salan an tiştekî pê têle dayîn. qalibê solan, qalibê fîşekan |
| **qalik** | qaqil, qaşilê hişk, wek qalik gûzan, qalik behîvan |
| **qalind** | sitûr |
| **qalûle** | qaşikên daran ku hişk dibin û li hev tên pêçan, wek lûle |
| **qam** | dirêjiya bejnekê, bejn, qama wî gelek xweş e. Min av qam kir. |
| **qamçî** | tajank, qirbac |
| **qame** | silehek wek xençerê lê rast û dirêj, game, kaşê rast û tîk, min berê xwe da qame, ez qame çûm. |
| **qamîş** | giyayekê di ber çeman de dibe û nava wî vala ye û hişk e, selikan û zembilan jê çê dikin |

| | |
|---|---|
| **qamûş** | ji kîr re tê gotin, qamûşê wî kul bûye. |
| **qamûşk** | qaşikê birînê, birîna min qamûşk girtiye |
| **qancûxe** | benikên pişt şîn ku pê heqîbê girê didin |
| **qandelûk** | tasikên ku ji bo mast ji axê çê dikin |
| **qantir** | hêstir |
| **qanûn** | rêzan, ew tiştê ku riya rast û xwehr pêş me dike |
| **qapan** | tirazî, mêzîn, giranî ez xwe naêxim qapana wî. |
| **qap** | qapok |
| **qapqap** | sola binê wê dep û rûyê wê qayîş |
| **qapsun** | ezbeya ku têxin dawiya fişekê û pê diteqe |
| **qapût** | serpiyê ku zivistanê di ser hemî cilan de li xwe dikin |
| **qaq** | qeşa, bûz |
| **qaqreş** | celebek gûrrê dijwar. Te em birin qaqereşê. |
| **qaqe** | |
| **qaqil** | qaqit, qalik, qaşik, qaqilê gûzê |
| **qaqilok** | sariya rû, qaqilokiya wî mirov bêzar dike. |
| **qaqişk** | teyrekî reş ji kevokê biçûktir |
| **qaqirîçik** | qaqirî, ew lûla ku mirov nefesê pê distîne |
| **qar** | para ku feqe xwarina xwe bi peşkê distînin |
| **qarç** | kevaşe, qaçik |
| **qarçû** | |
| **qarçik** | hestiyê boçika mirov, qamçikî bûn ba dikeve pişta yekî |
| **qarîn** | dengê ku ji ber êş an tehliyê ji mirov dertê |
| **qarîş** | asraqê ku ji hejik mejikan çê dikin |
| **qarrîte** | dar, max |
| **qarpîçok** | bê goşt, qirçik |
| **qarqar** | qirîna li pê hev, qorqora wî diçûn binê dinê. |
| **qarqarok** | kesê ku her gav dike qareqar |
| **qarûme** | celebek giya tête xwarin |
| **qarûş** | sivmik, mişteka biçûk, gezmik |
| **qas** | çiqas, evqas |

| | |
|---|---|
| **qaş** | kevirê gustirê qasê hingulîskê |
| **qaşil** | taşil, talaş, toşal, qaşilê zebeşan xiyaran |
| **qaşim** | giyaî bêhn xweş |
| **qaşo** | goya, herwekî |
| **qat** | tebeq, çarqat, çartebeq, qat bi qat |
| **qatiya** | |
| **qatix** | her tiştê ji şîr çê dibe, mast, penîr, çelik. kesk, nivîşk, dew |
| **qatî** | rext, qorrê fişekan, qatiyê fişekan |
| **qewîn** | celebek petîx, kelek qawinê Diyarbekirê |
| **qawît** | peloka ard û rûn û şekir |
| **qax** | meyweyê hişk kirî |
| **qaxik** | hermên hişkkirî |
| **qayil** | razî, ez bi vê kira we qaîl nabim. |
| **qayîlî** | qayîl bûn, ma tu qeyiliya xwe bi vê kirê tînî? |
| **qayîm** | xurt, metîn |
| **qayîş** | ji çerm çêkirî pişt, |
| **qayîş** | rik bend filan qayişê bi min re dikişîne. Ez nakevim qayişa wî. |
| **qaz** | teyrekî kedî |
| **qazaxî** | celebek ga û çêlekên mezin |
| **qazix** | biroşa pir biçûk |
| **qazim** | tayê ku ji mû an heriyê çê dikin û gelekî xurt e |
| **qazî** | hakimê ku li ser şerîetê hikim dike |
| **qeb** | bi destan pevçûn, guleş girtin |
| **qebal** | |
| **qebale** | girtina karekî bi bihayekî xuya lê ne bi demeke bellî |
| **qebe** | ne nazik hişk û bêvac |
| **qebetî** | hişkî, bêvacî ne narînî |
| **qebahet** | suc, guneh, ma qebheta min çi ye? |
| **qebilandin** | çandina meyweyekî ji bo bûyînê |
| **qebilîn** | bûyina meywekî ku digehe xwarinê |
| **Qebo qebo** | qeqibo, ji bo pevçûnê meydan xwestin |

| | |
|---|---|
| **qebqeb** | qirêna di pevçûnê de. Ew çi qebqeba wî ye? |
| **qebul** | qebulkirin, qîma xwe pê anîn, Ez mezinatiya wî qebûl nakim. |
| **qeda** | bela ku nayête bîra mirov, qeda pêketî |
| **qedan** | qediyan, kuta bûn, Em ji vî kerî qedan. |
| **qedandin** | kuta kirin, xilas kirin, dawî anîn |
| **qedaker** | kesê ku ji şer û pevçûnê pir hez dike |
| **qedar** | dehyeka ku ji meywe dihate sitandin |
| **qedek** | |
| **qeder** | ew tiştên ku kirin û bûna wan ne bi vîn û daxwaza mirov in û bêhemdê wî dibin. Ew yek di qedera wî de hebû. |
| **qedexe** | dest danîna ser tiştekî, hicîz. me malê wî qedexe kir. |
| **qefa** | ber zinarê ku ro û baran xwe tim nagihîne nîv şikeft |
| **qefaltin** | girtin û bindest kirin. Em çarmedor çûnê me ew qefalt. |
| **qefs** | cihê ku ji şivik, dep û hesin çêdikin ji bo teyran û dehbeyên dirinde |
| **qefilîn** | ji hal û desthilanîn ketin. Ji serman qefilîn, ji tirsan qefilîn. |
| **qefle** | birek an gelek mirov dema li ser sêyekê diçin. |
| **qefş** | |
| **qeftîş** | cerikên ku li erdê dikevin û diqelişe, cerikên ku li tehtan dikevin û ji hev diçe, qeftîsa zinêr |
| **qefz** | çimt. Wî qefzek da xwe. |
| **qehirandin** | xeyidandin |
| **qehirîn** | xeyidîn |
| **qehwe** | dareke, li welatên germ çar dibe û berê wê diqewirînin û tal û şêrîn vedixwin |
| **qehp** | tol, qunde, duqul, ango durû |
| **qehitîn** | qela, ew madenê ku pê firaxan sipî dikin. Me firaxên xwe qelê kirin. |
| **qelîk** | |
| **qelaç** | nîvgirên tehtin kevirîn di erdên qeraç an çiyan de |
| **qelaçe** | kozik an sîpera ku ji tehtên mezin hatiye pê |
| **qelan** | qeliyan, dawî hatin, tişt jê neman |
| **qelandin** | dawî anîn, tiştek jê nehiştin |

| | |
|---|---|
| **qelaştin** | ji hev kirin du telîşan. Wî darî biqelêşe. |
| **qelaw** | qelew, kesê gostgîr, Qelawiya zêde ne baş e. |
| **qelem** | dar an hesinê ku pê nivîsan dibe |
| **qelemgîr** | qelemgîrî, kesê ku qelemê baş digire |
| **qelibîn** | tê wer bûn, wergerîn, Dar qelibî, ro bi çiyê de qelibî. |
| **qelibandin** | wergerandin, tê wer kirin |
| **qelişandin** | kirin du qelîşan, telaş telaş kirin |
| **qelişîn** | ji hev çûn, derizîn û ji hev dûr ketin, dep qelişî |
| **qelizandin** | qulizandin, xwe xwar kirin, xwe nizim kirin. xwe deqetizîne. |
| **qelizîn** | qulisîn, xûş bûn, xwe nizim kirin |
| **qelî** | goştê ku di danê xwe de tê sor kirin û zivistanê têxin xwarinê |
| **qelînok** | genimê qelandî |
| **qelîpîvaz** | celebek xwarin, goşt û pîvaz bi hevre tête qelandin |
| **qelîsêl** | celebek xwarin, goşt di sêlê de diqelînin û sîrmastê bi ser dikin |
| **qelîş** | qelş, tîşê ku di depan cilekî de çêdibin, qelîşa dep, kirasê dep, kirasê min qelişî, ango çiriya û ji hev çû, |
| **qels** | jar kemqewt |
| **qelsî** | qels bûn, ji ber qelsiya wî me dev jê berda. |
| **qelûn** | qel, ji dar, an kevir an hesin çêdikin û pê titûnê dikêşin, qelûn dû perçe ne, tîrik, sivik, serik |
| **qelûnkêş** | kesê ku qelûnê dikêşe |
| **qeman** | qemiyan, li pêş agir sor bûn, pizirîn, diqeme, diqernîne |
| **qemandin** | li pêş agir sor kirin, an pizirandin |
| **qemp** | zoyên mûzikî, du tiştên bi heve mûsikî di zikmakî de. Ev zaro qemp in. Ev gûz qemp in. |
| **qemç** | çengek. nîv mist, dagirtina destekî |
| **qemçik** | dûvê bizinê |
| **qemçûr** | dayîna ku dewlet ji bo pez her sal distîne. qemçûra pez |
| **qemelax** | hêl, dema berf dibare nêçîra bi destan |
| **qemer** | reşe, bervereş |
| **qemerî** | qûrûs |
| **qemihandin** | |

| | |
|---|---|
| **qemihîn** | |
| **qemrandin** | li pêz agir an ser agir sor kirineke sivik |
| **qemirîn** | li pêş an ser agir sor bûneke sivik |
| **qemitandin** | zeliqandin, mûsikandin |
| **qemitîn** | zeliqîn. mûsikîn |
| **qemtik** | destmala hevrîşim a biçûk ku jin didin ber serê xwe |
| **qend** | şekirê kolaz, qendek, kolozek şeker |
| **qenav** | şerbeta şekir |
| **qendeharî** | celebek genim |
| **qendîl** | çira |
| **qene** | qe nebe, madam ew diçe qene tu neçe |
| **qepiçandin** | çeng kirin, qefisandin, Min xwe qepiçandê lê destê min negihaştê, |
| **qepiçîn** | çeng bûn, qefizîn |
| **qer** | reşe, qemer, beranê qer, miya qer |
| **qeraç** | erdê hişk û bi xilik û bê dar û ber |
| **qerade** | qurde, bêkêr, netişt |
| **qerafil** | xizêmê ku jin têxin difnê xwe |
| **qeram** | çermê ku li devê kûpan dipêçin |
| **qerrase** | hesinê ku pê keviran li cih dilivînin, maniwela. Filan qeresekî mêran e. |
| **qeraş** | aşvan, kesê ku di ber aş de |
| **qerbûs** | pêşiya zînê hespê, qerbûsê şîn |
| **qereçî** | ew kesên ku jê re cih û welat nîne û bê saz û diziyê tu karî nizanin |
| **qerekor** | |
| **qereroj** | rojên bi pûk û bilek, kesên ku rojên xweş di jîna xwe de nabîne û her tehlî tên pêşiya wî |
| **qerf** | henekên bi mana, gotinên hişk û du mana. Ma tu qerfên xwe bi min dikî? |
| **qerfok** | kesê pir qerfan dike |
| **qerimandin** | westandina reh û hestiyan bi rawestîneke dirêj li cihekî bê lîv |
| **qerimîn** | westîna reh û hestiyan ji ber nelivîne |
| **qerisandin** | ji serman pûç û bêtevger kirin |

| | |
|---|---|
| **qerisîn** | ji serma pûç û bêtevger bû mirov, destên min qerisîn. |
| **qerîsek** | piştî berf an baranê serma ku tê û erdê û avê dicernidîne |
| **qelm** | depê ku kevirên çeqmeq têxin binî û davêjin pêgan û pê sap hûr dikin û benderan digerînin |
| **qermiçandin** | civiqandin, kaxez qermiçand. |
| **qermiçîn** | civiqîn, nizam çima rûyê wî qermiçiye. |
| **qermilandin** | li pêş agir girtin û reş kirin |
| **qermilîn** | li peş agir man û reş bûn |
| **qermîç** | di pîrbûnê de civiqên ku dikevin çermê rê enî û sitoyê mirov |
| **qermîçek** | tevayiya qermîçan, qermîçekên eniyê |
| **qerneqasî** | |
| **qerpal** | qirpal, cilên peritî û pir pîne. Qirpal bi ser de dihatin. |
| **qerpik** | gangilosk |
| **qerqarik** | qirqirik, qaqiriçik. Ew lûla gewr û kirtik ku serîk di kezeba sor de û serê din digehê gangilokê an dev |
| **qerqer** | kefen, ew cawê ku di cengekê miriyan dipêçin |
| **qerqûş** | ser sal, 31 berçille û 1 çile. Qerqûş merqûş. xwedê kurek bêxe dergûş, serê salê binê salê xwedê bêlê malxay malê. |
| **qersûn** | sihena dev fireh ku ji axê çê dikin |
| **qeretûn** | xweriniya berî rohelat. di vê çaxê de karker, cotkar û cewêlekên gundî nan dixwin da ku li rohelat re li ser karên xwe bin |
| **qertaf** | gewriya petika mêşhinguvê |
| **qertilandin** | xerpiçandin, kolaneke di rûvê, gîsnê wî kûr neçûye, tenê erd qertilandiye, berber serê wî baş kur neki riye, lê qertilandiye. |
| **qerwaş** | cêrî, jina ku bi cemeke xizmeta malekê dike |
| **qesar** | şûştina cawê bi xasil, cawê qesarkirî |
| **qesidandin** | berî dan hinekan ji bo qesdekê |
| **qesidîn** | ji bo qesdekê lê qewimîn |
| **qesel** | qestel, pincarê genim berî ku avis bibe |
| **qesifandin** | jêkirina dar an goşt |
| **qesifîn** | jêbûna dar an goşt |
| **qesp** | cilayê xûrmê |
| **qestî** | qestane, tevî ku zane dike. Ne ji nezanî, lê tu ji qestî wa dikî |

| | |
|---|---|
| **qeşa** | qaq, bûz |
| **qeşartin** | qaşikê tiştekî li ser rakirin, qeşartina zebeşan qeşartina xiyaran, qeşarti na pîvazan |
| **qeşem** | qeşa ku zivistanê digire ser çeman |
| **qeşitîn** | qeşiyan, ji rû derketin, hatin qewitandin |
| **qeşmer** | beredayî, mesxere yê ku xelk bi kir û bîra wî dikenin. Her tiştê bê rê qeşmerî ye. |
| **qeşmerî** | kesên ku qeşmer dikin |
| **qet** | tu caran. Ez qet neçûme Mehabadê. |
| **qetan** | qetîn, qetiyan, perçe bûn, kerî bûn, cilê min qetan |
| **qetandin** | çirandin, perçe kirin |
| **qetran** | danê darekê yê rengê wê reş û behna wê kirêt e ji gelek tişt re bi kêr tê |
| **qewal** | ritbeke di ola êzidiyan de |
| **qewale** | teehîd, girtina karekî bi bihayekî xuya |
| **qewam** | ji bo badana daran, singeke serî kun e û di erdê de dadiçikînin |
| **qewad** | hosteyê ku ji axa adetî firaxan çê dike, şerbik, kidûn, cer, kûpik, kûp, den, kûz, kûzik |
| **qewarek** | dendikê behîvan ên nûh |
| **qewartin** | nava tiştekî kolan û kun kirin |
| **qewaş** | kelgîra mezin û kûr û bi destik |
| **qewet** | hel. filan bi qewt e. |
| **qewilandin** | anîn ber bûyînê razî kirin. Min ev jinik qewiland. |
| **qewilîn** | gihêştin xwarinê bûn.Ev gûz qewilîne, ev keç qewilîne,an go ber zewac e. |
| **qewimandin** | li ber kirêkê hiştin, me lê qewimand, wek mêran dest bir xwe. |
| **qewimîn** | li ber kirekê man. Li me qewimî, nema me dikerî dev jê berda. |
| **qewitandin** | berdanê, dan ger, me ew li vir qewitand. |
| **qewitîn** | hatin gerdan. Ew min diqewitîne. |
| **qewizandin** | hal kirin, çeng kirin, wî ez qewizandim. |
| **qewizîn** | hal bûn, çeng bûn, ji tirsan ez di ser wî re qewizîm. |
| **qewîtî** | cemî, ji bo gihandina gotinekê, Ji cihekî re min qewîtî lê kir. |
| **qewm** | gel, netewe, millet, qebîle |

| | |
|---|---|
| **qewsel** | gotina ku mirov dikemîne. ji xulya re ji tête gotin |
| **qewş** | himbêzên genim ku têxin qidîşan |
| **qewd** | destikê şûr, xencer û qamê |
| **qewdik** | destî, baq |
| **qev** | goya |
| **qeyar** | kevî, vî tiştî qeyar ke, an go keviyên wî dûzan bike |
| **qeyd** | hesinê ku têxin lingê hespan, yê ku têxistin lingê dîl û bindestan |
| **qeydim** | qasa ku cotek rojekê dajo, du qeydim erd, sê qeydim erd |
| **qeyserûn** | |
| **qeysik** | darlox, darê ku pê bangore dikêşin |
| **qeysî** | celebek mişmiş |
| **qeytan** | pişt benê ku li ser pehniyê doxinkî diwûnin |
| **qeza** | ew tiştê ku bêhemd li destê mirov dibe, an tê serê mirov |
| **qezaz** | kesê ku bi hebirşim disûxule û gulik û gulbendan çê dike |
| **qês** | qiyas, kesim girtin |
| **qible** | aliyê ku mala xwedê lê û misilman berê xwe didinê |
| **qibrax** | peyayê ku ji xelkê re gewadiyê dike, pêzeweng |
| **qibraxî** | qewadî û pêzewengî kirin |
| **qidîk** | qidî kirin. Ew min qidqidi dike. |
| **qidqidî** | bi destan bi paşil û bin çengên yekî lîstin û kenandin |
| **qidûm** | qencî an neqenciya ku bi rûyê mirov re digehê hinekan |
| **qijilandin** | helandin û sarkirina rûn |
| **qijilîn** | qijirîn, qijqijîn, wek rûn sor bûn û şewitîn |
| **qijik** | qîjalik, teyrê leşxwer û reş û gewr |
| **qilêr** | qirêj, gemara ku ji laşa mirov çê dibe. Ez qilêrî bûme. |
| **qilêrî** | kesê laş bi qilêr |
| **qilêwî** | kesê ku xwe berdide bin avê û tê de tiştan bi dertêxe |
| **qilix** | meqesa ku pê hiriya pez dibirin |
| **qilîç** | darikekî wek qema ne têxin nîveka haletê cot |
| **qilîçik** | tiliya biçûk |
| **qilop** | kesê bi lingekî, an ji lingekî seqet kulek |

| | |
|---|---|
| **qiloz** | xûz, kesê ku di pişt an sînga wî de xûşî hebe, piştqiloz, sîngqiloz |
| **qilûmîk** | |
| **qimaş** | tayê ku dikin cil. qumaşê rîs, qimasê ebirşim |
| **qimqimok** | ew heywanê ku wek mar li ser zik zuj dibe û bi dest û ling e |
| **qinare** | |
| **qinbinî** | celebek pincar |
| **qinik** | giyayê ber avê |
| **Qinût** | çikas, xesîs |
| **qinyat** | qenaet, qîma xwe pê anîn |
| **qir** | şînê tarî. ji bo rengê hespan tê gotin |
| **qirr** | . 1. kesê ku çavekî wî şaş, çavê wî qirr e. 2. xwesiya ku zivistanê dikeve, îro qirr ket. 3. Dawî: Me qirra wan anî, ango me giş kuştin, kes jê nehişt. |
| **qiral** | padîşah, melîk, qiralê ingilîz |
| **qiramêr** | kurê ku nûh balix dibe |
| **qirandin** | qir kirin, bi carekê tinme kirin. Bê ev dar qirandin, Selahaddîn leşkerê xaçparêzan qirrand. |
| **qirraqir** | qirreqir, qelş û qirêna bi dengê bilind. Ew çi qireqirre wan e. |
| **qirax** | keviya avê perav |
| **qirboz** | rengê şînbozê tarî, hespê wî qirboz e, riha wî qirboz e. |
| **qirdik** | kesê ku di ser salê de cilên qeşmer lê dikin û pêdikenin |
| **qirêj** | gemar, destê wî qirêjî bûne |
| **qirêjahî** | qirêj bûn |
| **qirên** | li ser tiştekî peyivîn û gotina xwe ajotin pêş, minaqeşe |
| **qirrik** | qirak, teyrê reş ê leşxwer, gewriya mirov. Min dest kir qirika wî. |
| **qirim** | bela mezin, qirim pêketo. qirim, pozê girên ji keviran, pezkovî xwe avêt vî qirimê han. |
| **qirnî** | kumekî girover û biçûk e dikeve laşa mihiyan û xwîna wan dimije |
| **qirocir** | qirecir, xirecir, peyva di nav çand mirovan de bi dengê bilind ku mirov serwextî tiştekî nebe |
| **qiset** | çîrok, serpêhatî, me nizanî ka qiseta wî çî ye. |
| **qisix** | neqeba biçûk |

| | |
|---|---|
| **qismet** | par, nesîb |
| **qisûr** | kêmasî li qisûra min nenêre |
| **qişrik** | |
| **qirtik** | hilqik, qûrpik, qirtika min tê. |
| **qirûç** | çeng, nîv mist, tijî bûna destekî. Min bi qirûçan av vexwar. |
| **qirûş** | qemerî, sed qirûş kaxetek e. |
| **qirûşpere** | çemeka delal, ji serê sedî delal ji tiştê firotî hinek pere distîne ku jê re qirûşpere tê gotin |
| **qiyame** | kaş, hevraz, serejor |
| **qiyamet** | piştî qira bûna dinê, rabûna miriyan û hesab dayîn, wî qiyameta ma rakir. |
| **qîç** | derketina tiştekî gewr di nav tiştine ne gewr de. Se diranê xwe qiç kiriye. diran lê qiç bûne, yanê miriye. |
| **qîçik** | kenê ku pê diran xuya bikin. Ew zarok qiçikan dike |
| **qîçik** | gûzikên pembo ku nuh vedibin û pembo tê re sipî dike |
| **qîçmez** | . |
| **qîjvîj** | qijwîj, deng û qîreqîra bêvac |
| **qijqijok** | kesê ku qîjqîjê dike |
| **qîl** | xîp, mermul, her du diranên beraz ên mezin, |
| **qîl** | kulên ku bi der nabin û di laşa mirov de qûrmitekî dihêle jê re qîl dibêjin |
| **qîm** | razî bûn, min qîma xwe bi vê yekê aniye. Ew qîma xwe pê nîne. |
| **qîmet** | biha |
| **qîqî** | aletekî sar e wek kemençe ye, qereçî baş lêdixin. |
| **qîqî** | teyrekî biçûk e jê re darkutok û kutkutok jî tête gotin |
| **qîr** | wek qetranê reş e pê rêyan hillû dikin, zift |
| **qîrîn** | qêrîn, fîzar. dengê ku ji ber êşekê mezin ji mirov dertê. Qîrîna wî diçûn asîmanan. |
| **qît** | kerî û perçeyên ku li ber devê bivir ji daran radibe |
| **qîvar** | giyakî bi sitiroye ker gelek hez jê dike |
| **qîzik** | navê darekê, berê wê nîne, lê darê wê xweş vêdikeve |
| **qoç** | qiloç, qoçên berên, qoçên nêrî, qoçên kovî |
| **qoçan** | seneda erdan, ku hikûmet dide xwedî erdan |

| | |
|---|---|
| **qoçbehder** | giyakî ku pê zikê mirov diçe |
| **qof** | xûz, piştxwehr |
| **qofir** | pîr û piştxûz, peritî. Dev ji wê pîra qofir berde. |
| **qokel** | koxê ku dîwarê wî bi hişkeberê (bê herî) çê dibe û paşê bi heriyê dîwaran ji der ve didin |
| **qolek** | celebek giya ye tê xwarin |
| **qolinc** | hestiyên piste, parxan, qolinca min ket, an diêşe. |
| **qolatî** | girs, xurt, filan qolmatiyekî mêran e. |
| **qon** | zînber |
| **qop** | kesê ku devê wî wek devê qirdê ber bi derve be, dev qob |
| **qopik** | serê kîr, ew cihê girover |
| **qopilme** | |
| **qopiş** | piştî kirinê dema serê kîr diperçife |
| **qoq** | koka darê cihê ser erd. pistî ku tila tên birin qoqa darê. |
| **qoqilandin** | kolan, verotin, çavên wî qoqilandin. |
| **qoqilîn** | hatin kolan, hatin veratin, çavên wî qoqilîn. |
| **qoqik** | korx, qoqika çav, qoqika mêjû. |
| **qor** | rêz, sef |
| **qor** | pirsal, gelek pîr |
| **qorç** | bermayî, nekêr, qorça cigarê, duvik. qorça gûzê, qaşikên şîn |
| **qorik** | navmil |
| **qorix** | tirîtirş, berî ku tirî şêrîn bibe |
| **qorîn** | dengê bilind û sitûr |
| **qorqor** | ker |
| **qose** | şiva qelûnê |
| **qosk** | qewşik, du tayên lastîk têxin serê darekî bi çeq û pê xilikan tavêjin |
| **qoş** | qûş, qolan, piştqûn, qoşa qantirê.Te qûşa wî qetand. |
| **qoşik** | qaşikên daran |
| **qoşkurt** | serqoş û binqoş û tevî qoş |
| **qot** | serî, qatê wî, qatê çiyê |
| **qoz** | kevan, qews |

| | |
|---|---|
| **qub** | avahiya ku asraq ji kevir û girover |
| **quba** | mastê qetiyayî xerabuyî |
| **qubik** | avahiya wek qubê lê tev ji kerpiç |
| **quf** | ji bo porkirin û parastina qatix û nan ji şivên çî yê çê dikin, qufa mên, qufa qêtix |
| **quflik** | bazinê ji mircan |
| **qumbil** | kurmek e li genimê şîn û seridî çar dibe û şûra genim dimije û heban pûç dike |
| **qumrî** | teyrekî nîv kediye di dîwarên xaniyên bajaran de hêlîn dike |
| **qunderz** | qunders, celebek dirutin, filanê dirutina wê tev qunderz e. |
| **qunc** | . quncik, qurçik, qulçik. Keşe:her çar aliyên mezelekê ji derve enisk û di hundir ve qunc in. |
| **quncik** | quncên di rex argûn de, ji ber ku biçûk in |
| **quncirik** | qurincek, qurinc, bi serê tiliyan laşa yekî badan. Ew min diqurincîne. |
| **qul** | kun, vî darî qul ke, qulla gur. |
| **qulab** | |
| **qulebazî** | durûtî, hîlebazî, bê şerefî |
| **qulemêk** | kulêmek, goştê serhêla ranan |
| **quleteyn** | qîhana du şerbik av an pirtir di cihekî de ji bo destmêjê |
| **qulêl** | qulerî hev, ev çend hatiye nivîsîn, ez serwext nebûm |
| **qulf** | meyika bişkocê |
| **qulh** | qûn |
| **quling** | teyrekî koçer e. ji gazê mezintir û çav reş e. zivistanan diçe germiyanan û havînan diçe zozanan |
| **qulipandin** | wergerandin |
| **qulipîn** | wergêrîn |
| **qulik** | hepis, çal. Filan ket qulikê. |
| **qulopanî** | qeplanî, qulupanc, li ser serî telqoçik kirin, an di ser hev re gir bûn û ser û bin tot bûn |
| **qulp** | heleqe, qulpê derî |
| **qulpik** | qurpik, hilqik |
| **qulpirzank** | qulf, mêyika bişkocan |

| | |
|---|---|
| **qur** | ta û çêlik cehê me gelekî qur dabû. |
| **qurr** | herî, celb, îro baran zor hat û qur zehf e. |
| **quran** | kitêba ola Mihemed |
| **quraftin** | badan û hilkirin, ezê sitoyê wî biqurêfim. |
| **qurban** | yarî cejna qurbanê, ez qurban, ez gorî. |
| **qurç** | qurt. qult, bi qurçan avê vedixwe. Bi qurçkanî avê vedixwe. |
| **qurçandî** | bijangên çavan li hevdan, bi çavan îşaret kirin |
| **qurçin** | bijang, li hev dan, pê îşaret. Çavan li min diqurçîne. |
| **qurçimandin** | qurmiçandin, bi kaşkirin qetandin |
| **qurçimîn** | qurmiçîn, bi kaşkirin qetîn, min dûvê mar diqulê de girt û kaşkir bi dest min de qurçinî. |
| **qurçkirin** | qurçandina çavan |
| **qurre** | dilgir û ji xwe razî, quretiya wî nema tê kêşan. |
| **qurfik** | celebek nexweşiya zarokan. Ev zarok qurfikî bûye. |
| **qurifandin** | bi badanê an dehfdan jêkirin |
| **qurifîn** | bi badan an dehfdan jê bûn |
| **qurît** | kurît quraz, serê xwe daxistin ser avê û devê xwe xistin nav. Ez qurîtî avê bûm. Ew quritî tasê bû. |
| **qurm** | qulun, koka darê jê ku di erdê de |
| **quroz** | qurît, kurît. Ew qurozî avê bû. |
| **qorq** | qub, mirişka ku di ser hêkan de rûdine |
| **qurihandin** | bi pençan rakişandin û xurandin |
| **qurs** | qurik, nîv daîre, wek hîv |
| **qurisandin** | kurisandin, di rû re birîn, wî porê xwe qurisand, wî cehê me qurisand. |
| **qurisîn** | kurrisîn, di rû re kurt hatin birîn |
| **qurîs** | kurîs, rût bê por an giya. Serî ji wî qurs bûye. |
| **qurix** | navê sitêrkekê benda qurixê |
| **qurt** | qult, qum, qurtek av, tijî bû na dev |
| **qurtîl** | tevlîhev fîlan, her tiştê wî qurtii e, xwarinek qurtîl dixwe. |
| **qurtîlkuj** | kesê qurtîl xwarinê dixwe |
| **qusan** | qusihan, piştî rêveçûnek dirêj westin û li hev gerîn |

| | |
|---|---|
| **qusandin** | birîn |
| **qut** | kin, kurt, ne dirêj. jê qut bûn, jê bi dûr ketin, jê qut kirin, jê bi dûr xistin |
| **qutifîn** | qefilî, ji serman an tirsan ketin hev. Ew qutifiye hev. |
| **qutik** | bi ser kiras de tê li xwe kirin, dirêjiya wî heya ser kulemekan e |
| **qutim** | piştî birîna darê koka ku di erdê de dimîne |
| **qût** | qiwît, zad û xwarin |
| **qûtnî** | celebek cawê hebirşim ê sitûr |
| **quz** | kuz, dergehê dinê, ê pêşîn, cihê mîzê li cem jinan, mirov di qûz re dikeve dinê û di qûzê re jê derdikeve. |
| **quzilqurt** | kurmekî bi jehr e, dema pez di nav giya de dixwe pê dimire |
| **qûç** | koma keviran ku di sînoran de ji bo nîşanan datînin, mitê ji kevirên mezin pêkhatî |
| **qûm** | axa di saxên derya û çemên mezin de, çiqas av bi ser de were nabe qur |
| **qûn** | cihê ku qirêj û gemar, xwarinê tê re dertê, qûn bi gû |
| **qûnbetal** | jinebî, jina bêmêr |
| **qûnç** | ji bo nîşana cihekî kevirên ku didin ser hev. Ev qûnça filan e ango cihê ku tê de hetî kuştin. |
| **qûtî** | elbik.. qûtiya cigaran, qûtiya goşt |
| **qûnde** | kesê ku xwe dide, mêrê qûnde, jina qûnde |
| **qûnik** | dawî, baçik, qûnika cigarê |
| **qûntax** | |
| **qûp** | kesê ku destekî wî di livokê de jê be |
| **qûz** | kûz, kûje, heywanekî biçûk û kavilê wî gelekî biha |

# R

| | |
|---|---|
| **ra** | reh, rek, rehên di laşê |
| **rûxurok** | cihê kû xûriyê di ser çavan de kirêt kiriye |
| **raber** | rave, reşkirin, nîşandan, zû reberî min rake. |
| **raberî** | nîşandan ravekirin |
| **rabûhertin** | jê derbaskirin, vê yekê di xwe ve rabûhêr e. |
| **rabûn** | helestin, ji ber min rabû, li min rabû, berberî min rabû, kela min rabû. |
| **raçandin** | |
| **raçav** | |
| **radan** | tê re derbas kirin, zû derbasî hûndir kirin, xistina nav bindestê xwe, rada wê kûrê |
| **radok** | ew tiştê ku tê radan |
| **rafirrandin** | bi birê xistin |
| **rafirrîn** | bi firrê ketin |
| **ragirtin** | ji bo demekê girtin, xwe ragirtin, sebir |
| **rahet** | hêdî, bi semt, rahet. rahet ez çûm. |
| **rahetî** | vehesîn, hin rehetiya xwe ne dit. |
| **rahjandin** | pê girtin û hejandin |
| **rahiştin** | pêgirtin û di dest xwe de hiştin |
| **rajêr** | hêla jêr, ew rajêrî me rûnişt. |
| **rajor** | hêla jor. Ew rajorî me çû. |
| **raketin** | veşelîn, çiqas ku li mama xewê tête gotin jî ne welê ye, timê bi mana raşan û veşelînê ye. |
| **rakirin** | hildan, vî darî rake, te cil rakirin? lê rakirin, tê rakirin |
| **rakişandin** | di erdê re kişandin, tar kirin |
| **rakişîn** | di erdê re kisîn an tar bûn |
| **rakutan** | dan ser hev û kutan. Hesinker hêsin radikute. |
| **raman** | fikirîn. Ramana wî ne di cî de ye. Dirame, narame. |
| **ramedîn** | Veşelîn, li ser tişteki raketin |

| | |
|---|---|
| **ramezandin** | li ser dev û rûyan raşan. Xwe raneweşîne da ku pê li pişta te bikim. |
| **ramîsan** | paç kirin, maç kirin, min ew ramîsa. |
| **ran** | Paqa qalind, navbera çok û sêvokê |
| **ranan** | dirêj kirin, radan, min lingên xwe ranan. |
| **randin** | |
| **rapelikîn** | bi dest û lepan rahêlana hev. Em repelikîn hev lê ketin nava me û nehiştin. |
| **raperrîn** | tê re derbas bûn. em li avê raperrîn. |
| **rapêçan** | li hev pêçan û xistin, hemda destê xwe |
| **rapêçayî** | hati rapêçan |
| **rapon** | |
| **raser** | serhêl, rajor. Cihê dijmin raserî me bû. |
| **rast** | ne derew, ne xwehr |
| **rast** | erdê bê kaş û newal, rast bi rast |
| **rastek** | ew dar an hesinê kû di ber re xêşan dikêşin |
| **rastgo** | kesê kû rast dipeyive û derewan nake |
| **rastik** | di por şeh kirinê de xeta ku di nav por de dihêlin |
| **rastî** | ew tiştê rast, rastiyê ji wî bizane |
| **rastûçep** | him rast û him çep. |
| **raşidandin** | baş şidandin, min xwe raşidand |
| **raşikandin** | perçe perçe kirin, tev ji hev xistin, koçer ji mala mîran reşikandî benda şêran. |
| **ravayî** | nîşan dan, royê dan |
| **rave** | nîşan, ray, rave min bike |
| **ravekirin** | nîşandan, jê re dan xuyakirin, pêşberî kirin |
| **rawartin** | derbaskirin, guhartin, min ji vî seyî rawêre. Navê min ji vî tûpelî rawêre rûpelê din, |
| **rawesan** | rawestiyan, pê re man. Êş pê re rawestiyan. |
| **rawestek** | cihê ku lê radiwestin, dimînin. Rawesteka balafiran. |
| **rawestin** | sekinîn, man. ez li cem wî rawestîm. |
| **raweşandin** | rahiştin wî xurt hejandin. Carekê vê tûyê raweşîne. Me destek tifing raweşandê pê re ket erdê. |

| | |
|---|---|
| **raweşîn** | xurt hatin hejandin, Vî mehfurî baş raweşîne. |
| **rawir** | dehbeyê dirende; şêr, piling, gur, hirç ... |
| **raxer** | çi tiştê ji bo rûniştinê di meşelê de tête danîn û tê raxistin |
| **raxistin** | li erdê pehn kirin, raxistina navmalê, vê tejê rexine. |
| **raxwestin** | eman xwestin, filan hatiye raxwestinê. |
| **ray** | eman, filan nayê rayê. |
| **razan** | nivistin |
| **razandin** | nivistin dayîn |
| **razek** | bi henek teqlîdê yekî kirin, qeşmerî pê kirin |
| **raziyang** | razyanik, hêliş |
| **razî** | qîma xwe pê anî, ji xwe şaşî. dilgir |
| **re** | jê re, pê re, ji wî re, bi min re. |
| **reben** | kesê ku tiştek ji dest dernakeve, bê kes |
| **reca** | hêvî, |
| **recakarî** | hêvîkarî |
| **recifîn** | lerizîn |
| **recfînek** | lerizina jiber tayê an tirsê |
| **recifandin** | lerizandin |
| **recû** | hêviya tiştekî ji hinekan kirin. Filan çûye recûyê. |
| **ref** | birrê teyran, gêş |
| **refik** | ji bo danîna tiştan depên ku li ruyê dîwarê meşelan datînin |
| **refo** | revo, keriyê dewarên ku her li çolê dimînin û tu caran nakevin bin banan |
| **reh** | ra, rehên di laşa mirov, rehên daran, filan reha wî ne paqij e. |
| **reha** | filitîn, xelasî, |
| **rehakar** | yê ku kesekî an tiştekî an welatekî xelas dike |
| **rehakar** | xelaskar, filan rehakarê min e. |
| **rehm** | dilovanî, rehm lê kirin, lê hatin rehmetê, rehma xwedê lê. |
| **rehmetî** | kesê rehm lê bit, mirî |
| **rehwan** | rehwal, zû meş, hespê rehwan |
| **rehêl** | cihaş, cil û nivînên ku ji bo bûkê dikin |

| | |
|---|---|
| **rehmet** | xêr û xweşî, baran. rehmeta xwedê lê be, îsal rehmet nehat, ango baran nehat. |
| **reht** | west, êş, reht bûme, ango westiyame. |
| **reilîn** | |
| **rejû** | reşû, komir, şewitî, kizirî, filan tişt şewitî bû rijû, nema bi kêr tê. |
| **remezan** | meha ku tê de rojî tête girtin |
| **remil** | falên ku bi qûmê vêdixin. Remildar ji min re remlek avêt. |
| **remildar** | kesê ku remlê darê û falan vêdixe |
| **remî** | gurrika kesk ku ji agirê rejûyê radike û bi jehr e |
| **remo** | peyayê bi nav û deng |
| **reng** | lewr, sor, zer, kesk, gewr, yek rengîn, reng: rewş, filanê rengê meşinan pê dikeve, |
| **rep** | serhildayî û hişk |
| **repandin** | xurt lêdan, bi şertê ku dengê lêdanê xweş bête bihîstin. Min repande wî. |
| **repin** | erdê ku şiliya wî hindik dibe û lingê mirov pê de naçe. Ev erd repin bûye, Ev berf repîn bûye, |
| **repisandin** | bi lêdan û zorê dewisandina kîs û çiwalan ku rep bisekine |
| **repisîn** | |
| **repîn** | dengê ku ji ketin an lêdanekê tê. Repîna wî dihat, |
| **req** | heywanê wek kûsî di avê de, perçê kavilê reş yê bi debax, tîr ne ron. |
| **reqandin** | bi deng lêdan, repandin, me reqande hev, ji nexweşan re xwendin. Jê re avek reqand, yanê jê re li avê xwend, erd şeqandin :yanê baş avdan. Filên baxçeyê xwe reqand. |
| **reqişandin** | xurt reşandin. baranê reqişande diwêr. |
| **reqişîn** | xurt hatin, reşin. baran reqişî |
| **reqîn** | dengê lêdan, an ketina tiştekî. Ew çi reqîn e? |
| **resim** | sûret, sih. resma wî baş derket, |
| **resimandin** | resma yekî girtin |
| **resimîn** | xwe resim kirin, resma xwe girtin |
| **reş** | rengê reş |
| **reşandin** | pejikandin, av reşandin |

| | |
|---|---|
| **reşayî** | dema berf dihele û erd xuya dibe, an li cihê bi av erd. Pîştî mehekê di nav derya de çavên me bi reşayiyê ket. |
| **reşbelek** | name, mektûb, min jê re reşbelekek şand. |
| **reşbeûn** | |
| **reşêle** | |
| **reşêşevê** | ew tiştê ku dibêjim bi şev xuya dibe û hin xelk jê ditirsin |
| **Reşik 1** | kesê çermên wan reş |
| **Reşik 2** | , xarûk, tati k, celebek, pêlavên kurdan. |
| **Reşik 3** | devê qûnê, cihê ku wek piziyan civiqî û rengreş. reşika wî, reşika çav |
| **reşîş** | ji reşandinê tê reşîşek baran |
| **reşme** | zincîre ser tevila hespan, hefsar, sê perçe ne şergaş. reşme û doxhefsar |
| **reşreşik** | giyake di nav zad de hişîn dibe û berî wî reş û girover in |
| **retim** | qûma gelekî hûr |
| **rev** | bazdan. me rev li dijmin da |
| **revandin** | rev lê xistin, rêya revê jê re çêkirin û alîkarî kirin. Me ev di nav lepên dijmin de revand. |
| **revde** | |
| **revî** | êxlî, keriyê hespan |
| **revîn** | bazdan, em li ber wan revîn. |
| **revok** | revoke yê ku direve, peyayê revok, kewê revok |
| **rewa** | piştî avdana erdê ew şiliya ku di nav axê de dimîne |
| **rewartin** | |
| **rewêtin** | |
| **rewijandin** | rewartin |
| **rewisandin** | kizirandin, me ser û pê li ser agir rewisandin. |
| **rewisîn** | kizirîn |
| **rewitandin** | rewijîn, rewjok |
| **rewîjek** | kolek |
| **rewneq** | xwesî, ronakî |
| **rewş** | hal, rewşa wî digel me ne ew çend baş bû. |

| | |
|---|---|
| **rewşok** | aletê ku pê dep av keviran dikolin |
| **rewt** | belf. bi derewan rastiya tiştekî veşartin. Rewtan li ser navêje, ez dehkera vê meselê dizanim. |
| **rex** | kêlek, cem. were rex min. |
| **rexdar** | reqdar qalcî, kesê ku ji bo parastina tiştekî tête danîn |
| **rexne** | întîqand. Tu rexne li min digirî. |
| **rexne girtin** | întiqad kirin |
| **rext** | taqim, rextê hespê: zîn û lîwan û zîneband. rextê fîşekan: porat. cihê ku fîşek, şeşan û xencer tev tê de bi cih dibin |
| **reyîn** | ewtîn, rewrew. reyîna sehan, ew direve. |
| **rez** | erdê ku tê de mêwên tirî tên çandin, rezê me. |
| **rezîl** | kesê ku kirên kêm dike |
| **rezvan** | kesê ku diçe ber şeşan |
| **rê** | cihê ku tê re diçin. bi rê ketin. bi rê xistin, ji rê derketin, ji rê derxistin, rê li ber girtin, rê dan, rê tê hebûn, bê rêyî |
| **rêber** | kesê ku rê dizane û rê raberî mirov dike |
| **rêbiwarî** | |
| **rêç** | Şopa ji hevketi |
| **rêçajo** | kesê ku rêçan dajo û tiştên winda bûyî bi ajotina rêçê dibîne |
| **rêdîn** | di ser çavan de cihê ku sih tê de dertê |
| **rêkirin** | şandin |
| **rêl** | mêş e, cihê ku dar tê de gelek in û ji daran pê ve tê de tiştek nîne |
| **rêncber** | kesê ku debara xwe bi dijwarî dertêxe, karker, cotkar, cewêlek |
| **rêpan** | li bende yekî an tiştekî man, rê payin, întîzar; ez li rêpana te bûm. |
| **rêşkirin** | paqij kirin, lê bi dehfdanê. Me berf li ser xaniyê xwe rêş kir. |
| **rêtin** | rijandin, wî dew rêt |
| **rêvin** | qirrêj |
| **rêvînî** | roniya ku ji gurrika agir diçe |
| **rêwîngî** | rêwî, kesê ku bi rêkê de diçe |
| **rêx** | rîx, pîsiya ga û çêlekan. Rêxa gund ya axê ye, yanê ji bo şewata mala axê ye. |

| | |
|---|---|
| **rêz** | sef. qorr, min hevalên xwe rêz kirin. Ew hatin rêza me. Rêz bi rêz me dan ber hev, kêzê, ket rêzê ji rêzê ketin. Ji rêzê derketin, ji ketin rêzê. |
| **rêzan** | nîşan, qanûn rêzana me hêja ye. Bê rêzanê karê hovan e. |
| **rêzanîn** | rêmasîn, rê ravekirin |
| **rêzik** | adet, rê û rezik |
| **rêzkirin** | sefkirina qor kirin, ez qîma xwe bi rêzkirina wî naynim. |
| **rib** | kart, çarîk. ji çaran yek |
| **ribanek** | dara ku bi tera xwe di erdekî de şîn dibe |
| **ribase** | |
| **ribat** | bestî, mandêre, kewê ku nêçîrvan girê dide |
| **ricim** | mextel |
| **rift** | rat, darê zirav û qeşartî, ji xartên zirav û dirêj û çeleng re jî rift tête gotin |
| **rih** | pirça ku li rûyê mêran dertê. rih dirêj: kesê ku riha xwe dirêj dike |
| **rihber** | xweyî can |
| **rihetî** | xweşi, vewestîn |
| **rihistîn** | canistîn, melkemot, ezraîl |
| **rihkose** | keskê ku riha wî gelekî firk û seyrek |
| **rihn** | ron, netîr, şorba me rihn bûye. |
| **rijandin** | avêtin, av rijandin. Wî dew rijand. wê savar rijand. |
| **rijî** | xwarina bê rûn |
| **rijik** | kizirî, piştî şewata dar, perçên şeş ku dimînin û mabin xwelî. hêjîrên derewîn |
| **rijîn** | rijiyan, derketina tiştekî di cihê an firaqa xwe de, rijîna avê, rijîna genim |
| **rik** | kin. Filan geleki bi rik e. Wî rika min xistiya dilê xwe. |
| **rikeh** | qefesa ku teyran têxinê |
| **rikew** | rikeh |
| **rikêb** | zengû, rikêbkirin, ajotin ser |
| **rikin** | kevirê ku têxin hîmê dewar bira rikim: kevirê ku têxin ser rikim, kevirê rêzê: kevirê ku piştî birarikim tête danîn. nivrêz. Nîvkork: |

| | |
|---|---|
| | kevirên ku dikevin dara kevirê rêzê, baqoq:kevirên têvel ku têxin nava dîwar, xîç: xilik û çaxiliqên ku têxin ber kevir an û cihên vala |
| **rikovî** | kesê bi rik |
| **rikrikandin** | ricifandin |
| **rikrikîn** | ricifîn, ji serman diranên wî dirikrikin. |
| **rim** | ew darê dirêj ku xiştekî hesinî di serê wî de bû û yê şer dikirin |
| **rimbaz** | kesê ku baş dizane rimê bişixulîne. Ristem û Cimşîd û Xalid hemzeyan Şerê Elî Aferîn ey şehsiwarî kurd û rimdarê ereb. (mela) |
| **rimbês** | ribês, giyake li çiyan dibe û mêriyeki wek riman di nîveka wî de dertê, ewî sêrî jê dikin, diqeşêrin û dixwin, tama wî miz û xweş e |
| **rimên** | rimên, rimrim, dengê ku di şikeftên kur de ji ber rêçûn an peyivîna hinekan tê |
| **rimpêjk** | rûnpêj, qersûn |
| **rind** | qenc, baş, çak |
| **rinde** | Rindeşe, aletê ku necar pê depan dûz û hillû dikin |
| **rindik** | xweşik |
| **rindî** | qencî, rindbûn |
| **ringaring** | dengê ku ji tiştên madenî tê |
| **riparip** | reprep, dema meşê dengê ku ji lingan tê, dengê riparipa ling |
| **ripîn** | repen, tevayiya riçên giya |
| **ripindan** | rependan, riç berdan, vê mêwê ripinên xwe dane erdê. |
| **riqariq** | riqeriq, şeqeşeq, dengê ku ji lingê dewar tê |
| **riqriqok** | ew tiştê ku di girtina wî de deng pê dikeve, dema man hişk dibe jê re tê gotin: rev, man, riqriqok e |
| **rist** | ji ristin, yanê badana hirî an pembo bi teşiyê an dolapê, min rîs rist. |
| **ristbûn** | şîv bûn, derketin. Diranê wî zerokî rist bûne. |
| **ristik** | rist, gerdanlix |
| **ristin** | birês, badan, bi teşî an dolapê ristina herî, pembo an ebirşim |
| **rişk** | çêlikên sipiyan ên gelek biçûk. |
| **rişte** | Şa'riye, hevîr, bi rûn distirên û bi destan ziran badidin dibe rişte |
| **ritam** | axa ku bi avê re tê û li cihekî dicive |
| **ritil** | zitir, şeş hoqe. Rîtira çifte 15 hoqe ve, ritira bajêr 2 1/2 in |

| | |
|---|---|
| **rizandin** | peritandin, ji ber kevnî û li pêş ro û baranê di hevde xistin |
| **rizde** | menteşe, hesinê ku pê deriyê penceran bi dîwêr ve perçîn dikin |
| **rizî** | ji ber kevî di hevde ket û peritî. Ev dep rişî ye. |
| **rizîn** | riziyan, ji ber kevn bûn an li ber ro û baranê peritîn. cilên min li ber ro û baranê rizîn. |
| **rizq** | paş, mesib, rizqê gur tê ber dêv. Ev tistê han rizqê min bû. |
| **rizyang** | rizyanik, giyake tê xwarin şomer, rizne |
| **rî** | gû kir, zarok bi xwe de rî. |
| **rîçal** | ji qaşûlên meywe an meywe bi xwe û ava şekir an mot an hingûr tête kelandin heya dibe agit, gelek celebên rîcalan hene |
| **rîçik** | rûviya qalin (em'a) |
| **rîn** | gû kirin |
| **rîp** | ardaf, fend, hîle, xap |
| **rîs** | hiriya badayî, ristî |
| **rîsî** | rêsî. risî, giyayê ku li hev dipêçin û zivistanê didin dewêr |
| **rîspî** | kal, rihgewr, navsal, bi rûmet, pêşî |
| **ristin** | bi teşi an dolapê badana hirî, penbo an ebirşim |
| **rîş** | kula xerab, kênûra pîs, çi kullek dijwar |
| **rîşî** | piskul û paxikên ku bi şar û keliyan de dikin, rîşiyên şarê |
| **ro** | ew sitêrka meşîn a ku dinê germ û ronî dike, Ro hat nîvro. |
| **roava** | aliyê ku ro tê re diçe ava |
| **rodî** | rûvî |
| **rohelat** | aliyê ku ro jê hiltê |
| **roj** | navbera rohelat û roava rojek e, heftek heft roj in, roja we xweş, |
| **rojen** | pencerên biçûk ku nizîkî asraqan vedikin |
| **rojin** | cihê ku dûyê argûnê agir jê dertê |
| **rojî** | danê rojekê ji sibê heya êvarê ne xwarin û vexwarin, rojiya remezanê |
| **rom** | girk.ji ber ku tirkan di erdê di bin destê romaniyan de dewleta xwe çêkirine heya îro jî kurdên serhedê bi wan re rom dibêjin |
| **romî** | esker an karmendên tirkan |
| **ron** | ne tîr, mastê me gelekî ron bûye. |

| | |
|---|---|
| **ronahî** | ew şewla ku tariye ji hev belav dike û her tişt baş tête dîtin |
| **ronak** | pir bi ronî |
| **ronî** | şewla ro an çirê, ro helat û dinê ronî bû. |
| **rot** | rewt, darê zirav û dirêj. |
| **rothesin** | şiva hesinî a dirêj |
| **rotik** | ratê biçûk |
| **rovî** | ew heywanê ku dijminê mirîşkan e û kavilê wî dibe kurk |
| **rovik** | rav, mûyên berzikê |
| **Rû 1** | ser û çav rûreşî, rûgewrî. |
| **Rû 2** | çemê biçûk |
| **Rûbar 1** | newala ku çem an rû tê re dibore. |
| **Rûbar 2** | pêşber. Ez rûberî wî bûm, |
| **rûbûk** | fediyok, kesê ku pir fihêt dike |
| **rûçik** | ser û çav. Ez di rûçikê wî de xêrê nebînim. |
| **rûçikandin** | pûrtikandin, ji cilan an pûrtê şilf û tazî kirin |
| **rûçikîn** | pûrtikîn, ji cillan tazî bûn |
| **rûdên** | dûrv, tevger, ji rûdêna wî xuya ye ku kurd e. |
| **rûdî** | ew kesê ku diçe keçekê ji bo hinekan bibîne, dema pê qaîl bû dixwazin, xatibê |
| **rûgeş** | |
| **rûgirtî** | pir fedî, şermiyok |
| **rûgirtî** | ew tistê ku rûyê wî tê girtin: to. Şorba me rûgirt, Şirê me rûgirt. |
| **rûkirin** | rûyê xwe tehl û tirş kirin. Filan rû kiriye, nizanim ji çi xeyidiye? |
| **rûl** | |
| **rû li ber** | kesê ku herdem di ber xwe de dinêre, nikare li çavên mirov binêre. |
| **rû li ken** | kesê ku hergav rûyê wî li ken e |
| **rû li jêr** | kesê ku hergav rûkirî û rû li ber e |
| **rûmal** | destmala ku pê rûyê xwe dimalin û zûwa dikin |
| **rûmerd** | kesê ku mêranî û camêrî di rûyê wî de dixwîne |
| **rûmet** | qîmet, qedir |
| **rûn** | tewaş |

| | |
|---|---|
| **rûnandin** | rûniştandin |
| **rûniştek** | cihê ku mirov li ser rûdinê |
| **rûniştin** | daniştin |
| **rûnpêj** | rimbêj, eqlewik, darleqîn, miqlik, tewa ku rûn tê de dirêjin |
| **rûpel** | rûyekî kaxezê. Ev kitêb 400 rûpel e. |
| **rûpişt** | astar |
| **rûql** | rûbar, pêşber. Em bi rûqalî hev ketin. Em hatin rûqalî hev. |
| **rûsar** | kesê ku ji bel kêmiya xwe ve fihêtkar dibe. Te ew rûsar kir. |
| **rûsarî** | fihêtkarî, şermisarî, Ew kir bû sebebê rûsariya me. |
| **rûşen** | rûxweş, rûgeş, rûşeniya wî ji ber dewlemendî û heyînê ye |
| **rûşûştî** | kesê ku fihêt di rûyê wî de nemaye |
| **rût** | rûs, bê pûrt, bê cil, bê mal |
| **rûtal** | sûtal, serserî |
| **rûtbûn** | zîvarî, belengazî |
| **rûtik** | kesê rût û bê rûmet |
| **rûtî** | bê malî, feqîrî |
| **rûtker** | kesê ku mirov rût dike |
| **rûtkirin** | ji mal, an cilan kirin, şêlandin |
| **rûto** | ji hemî sifatên pak bêpar û bê rûmet sa'lûk |
| **rûvî** | rûdî, ew lûlika ku xwarin ji aşikê heya qûnê tê re derbas dibe |
| **rûvîxwer** | heywanên ku rûviyan dixwin, seg û rovî. kesên ku çavên xwe datînên bermayiya xelkê |
| **rûxandin** | hilweşandin, xirakirin |
| **rûxisî** | secde, serî danîn |
| **rûxistin** | secde kirin |
| **rûxurî** | rû bi xurî |

# S

| | |
|---|---|
| **sabûn** | ji bo şûştina qirêja laş û cilan bi kêr tê. Li nik kurdan ji sê tiştan sabûnê çêdikin bez, kizwan, zêt |
| **sabxor** | |
| **sabxûl** | |
| **sad** | lat. evlek |
| **sadîl** | şitlê balcan îsot, balcanê sor ku hinekî bilind dibin û bi derdixin da ku di bîstan de biçînin |
| **saet** | aletê ku pê çaxa roj û şevê dizanin, şev û roj diwanzde saet in. |
| **safî** | xwerû |
| **safo** | berfa ku bapêç di cihan de kom dike. Bapêçê li ber derê me dû safa çê kirine. |
| **sahî** | sayî, dema ewr li pêşiya royê dertên. Îro dinê sehî ye. |
| **sahîk** | sergînên hişk û çak ku pir dûman nakin |
| **sak** | camûsa yek salî, nogin |
| **sakûl** | sakal, kesê ku tu kar û xebatê her li ber deriyan û çav li destê xelkê sûtal |
| **sal** | çar demsal, diwanzde meh, 365 roj, îsal sala xêrê ye, sîp basimbar, bax sibat, gamêş giran, naxirqewan |
| **salar** | serdar, qaîd |
| **salos** | durû, lûçek, midahim, libas |
| **salûx** | şerh, tu ji min re xweş salûx bide, dawî li min |
| **samîr** | xwa rineke ji garisê zer çê dibe |
| **samîtîl** | |
| **sango** | golikê du salî |
| **sap** | giyayê pirinc û garis berî hişk bûnê û genim û ceh piştî hişk bûnê |
| **saq** | şîp, navbera guzik û çongê, saqa min, saqa gorê, saqa cîzme. Çawa saq e, gore li yaq e. |
| **sar** | ne germ, ava çiyan qelekî sar e, ba têye dinê sar e. |
| **sarik** | |

| | |
|---|---|
| **sarînc** | cihê ku ji tehtan dikolin û ava baranê tê de digehê hev jibo zivistanê |
| **sarme** | xet an xêzên ku di daran, an hesin |
| **satandin** | pirinc kutan ji bo qeşartina çeltukê |
| **satar** | erdê di nav pêl an keleman de |
| **satil** | sîtîl, firaqa ku pê avê dikişînin ji paqir dewl |
| **satin** | |
| **satûr** | sadir, kêra qesaban a mezin ku pê hestiyan diskênin |
| **saw** | sitem, şekem |
| **savar** | genimê ku tê kelandin û hêran ji bo pehtinê |
| **sawirî** | |
| **sawî** | rast, bê çal û çîv. Ev dep î sawî ye. |
| **sax** | xweş, ne mirî, berjîn, heke ez sax mam vê yekê jê re nahêlin.Tu sax bi. |
| **sax** | keviya avê saxa derya, saxa çem, li ber saxa cem me nêçîre masiyan dikir. |
| **saxlem** | bê çirûkî, filan kes karê wî saxlem e. |
| **saxlemî** | saxlem bun |
| **sayî** | kirasê dirêj yê ku mêr li xwe dikin |
| **sayîs** | karê ku du salan te mam dike, kar gîsk, sayîs |
| **saz** | mûsiqa |
| **sazbend** | mûsîqar |
| **sazax** | hewa bi şilî ku li ber çeman û derya tê, îşev sazax hat, laşa min pê giran bûye. |
| **se** | kûçik seyê ne gurêx e |
| **sebir** | xwe ragirtin |
| **sed** | jimara 100î |
| **sedef** | qalixê heywanekî aviye û sipî ye, pê depan dineqişînin |
| **sedem** | ji bo, ez sedem xatirê te vî tiştî dikim. |
| **sedeqe** | tiştê ku mirov ji bo qenciyê dide feqîran |
| **sejde** | rûxisî, serî danîn erdê |
| **sef** | qor, rêz, ez di sefê te de rawestîm . |

| | |
|---|---|
| **sefa** | kêf, xweşî. sefaperwer, ji kefê hez kirin |
| **sefandin** | safî kirin, ji hev derxistin |
| **seft** | qirêj, cilên wî seftikî bûne. |
| **seh** | fehm, te gotina min seh kir. |
| **sehtî** | fehmkirin, pirsîn. Divê ez sehitiya vî tiştî bikim, |
| **sehkirin** | bihîstin zanîn, me welê seh kiri bû, lê xuya ye ne welê ye, |
| **sehnik** | sehena biçûk |
| **sehw** | saw, tirsa ji ber wehmê, sehw ket dilê min û nema min dikarî bimînim. |
| **sekan** | mayîn, sekana te li vî erdî nîne. |
| **sekar** | qufika ku pê kayê ji dewêr belav dikin |
| **sekav** | seyav |
| **sekerat** | ketina ber mirinê, tevgarên berî mirinê |
| **sekihandin** | ku kirin û rişî kirindan |
| **sekihîn** | kobûn û rişî kirin. Bav harsîw dixwin, diranê kur disekihin. |
| **sekin** | man, disekine, nasekine, dilê min bê sekn e. |
| **sekinandin** | rawestandin, cih danê ber nedan |
| **sekinîn** | rawestin, man neçûn, bi cîh bûn, lê sekinîn, pê sekinîn |
| **seknahî** | betalî, bêkar man |
| **sekte** | pêşî girtin, sekindin, nehîstin, wî sekte li îşe min xist. |
| **sektedar** | ew tiştê ku sekte lê dikeve |
| **sektekar** | kesê ku hergav sekte li kare xelkê têxe |
| **sehl** | kevirê pehnik û hillû |
| **selend** | sebînek, asraq |
| **selete** | zelete, xwarineke sar e û gelek celebên we hene, lê a mas, ji bacanê sor, pîvaz, îsot û hin giyayên mayî çê dibe |
| **selik** | kelik, qufika ku bi destan tête girtin, ji qamîş çê dibe |
| **selîlank** | ji bo ku zarokan hînî rêveçûnê bikin, ji dep çe dibe û bi teker e |
| **selîn** | seleb, sereb, alîgor, kevirên ku pe deve gorê digirin |
| **semal** | xweşî, menzere |
| **semanek** | navê teyrekî |
| **semax** | xurtî, xweragirtin, filan geleki bi semax e. |

| | |
|---|---|
| **semer** | bi koma ku ji sed peyayî re tête gotin. ser semer sereke sed mêrî |
| **semitandin** | bi xistina ava kelî rakirina qalik an pûrta tiştekî ser û pê semitandin |
| **semitîn** | bi ava kelî qalik an pûrt jê çûn |
| **semyan** | |
| **sencûr** | |
| **sendel** | pêlava havînî ku rûyê wî kunkunîşk |
| **sened** | kaxeza ku di ber daynekî de ji xwedî deyn re tête dayîn |
| **senisandin** | |
| **seqa** | avkêş |
| **seqem** | serma xûrt û hişk |
| **seqer** | bi bela kambax ker.Filan destê wi seqer e. |
| **seqet** | kesê ku ji dest an lingê xwe yekî bêpar, Destê wî seqet e, lingê wî seqet e. |
| **seqew** | seqawî, nexweşiyeke ji dewarê yeksim, çê dibe, dikuxe û çilm ji bêvilan tê |
| **ser** | jor |
| **serrad** | bêjinga mezin, pê kesê ji kayê dertêxin |
| **serraf** | kesê ku peran hur dike, an bi hev diguhêre |
| **seraser** | bi ser heve, ji serîkî heya |
| **serîk** | |
| **seraza** | azib, bê jin û zarok |
| **serban** | serê ban, ser xanî |
| **serbar** | barek sê perçe ne, du bendeke û serbar. Bila derdê wî jî serbar be. |
| **serbejêr** | Serbarjêr, sernişûv, derbejêr |
| **serbejûr** | hevraz, derbejor |
| **serbelk** | serbelg, tituna ku ji serê belkan dicivînin ya baş.binbelk: qûmaş, ya ku ji serbelkê bi şûn de dimine |
| **serben** | benê ku pê çarûxan girê didin |
| **serbest** | aza, jêhatî, çavekirî |
| **serbestî** | azadî, çavekirîkirin, jêhatî bûn |
| **serbidew** | şorba dew |
| **serbihî** | çîroka kurt, serpêhatiya kurt |

| | |
|---|---|
| **serbîhî** | belayên ku tên serê mirov |
| **serbilind** | kesê bi rûmet ku serê xwe danîne |
| **serbilindî** | bi rûmetî |
| **serbind** | ser û bin bûn, di ser hev re tot bûn |
| **serbiser** | di guhartinê de yek bi yekî, ser bi ser, yek bi yekî, duser, dudu bi yekî, sêser, sisê bi yekî |
| **sercil** | cila ku davêjin ser kurtanê dewar |
| **serçav** | rû, ser û çav |
| **serçerm** | çermê serê dewar |
| **serdan** | ziyaret. em çûn serdana wî, divê em serîkî bidinê. |
| **serder** | sender, sereder, serhêla derî |
| **serdest** | xalib, em serdestî wan bûn. |
| **serdestî** | serdest bûn |
| **serdor** | di cot de cihê ku hergav gayê cot lê vedigere, serdor û bindar |
| **serdorm** | celebek dîlan, awa kî govendê |
| **serdûv** | serê dûrikê mirov |
| **sere** | navsal, kal |
| **serece** | celebek êşa dewar |
| **serelî** | taqê jor |
| **sergele** | peyayê bijore. Filan sergeleyê eşîrê ye. |
| **sergerm** | kesê ku di her kirêkê de bi xûrtî xwe dide pêş |
| **sergerdan** | bê armanc |
| **sergevaz** | serekê ku di ser wî re serek nebin |
| **sergîn** | tepikên ku ji six û kayê çê dikin, ji bo xebatê |
| **sergo** | ting, poxan, cihê ku zibil û gemar tê de radike |
| **sergoş** | serîşme, serhêla hefsar, aliyê ku dorguhên dewarê digire |
| **sergûn** | ji cih û war bi dûr xistin |
| **serheng** | kesê ku li ser 3000 mirov, ritbekê eskerî, kolonêl |
| **serhev** | mintezem, aqilê wî ne li serhev e. |
| **serhingavtin** | zora yekî birin û ji tevger xistin. çû hafa wî serî jê hingaft. |
| **serhişk** | îmad. ye ku gotin bi serî de naçin |
| **seridandin** | ji seradê derbas kirin.Me genim seridandin. |

| | |
|---|---|
| **seridîn** | serî girtina zad, cehê me seridî. |
| **serî** | ji gewriyê berjor. serî jê sitandin, şeri lê gerandin, serê lê mezin kirin |
| **serîsang** | meha payizê a paşîn |
| **serkanî** | çaviya kaniyê |
| **serkar** | kesê ku ji karekî ber pirsiyar |
| **serkele** | sergoşa hefsar |
| **serene** | |
| **serker** | bê mêjû, ehmeq |
| **serkeş** | kesê ku ji gotina xwe venagere |
| **serkeşî** | ji gotina xwe venegerîn |
| **serkêr** | aliyê kêrê yê serî serkêra şûr |
| **serkêl** | depê ku didin ser stûnê û bin hêzan |
| **serlêv** | xêza ku rih û simbêl tê de diqedin |
| **serma** | sar bûn, min serma girt, sermayê li min da. |
| **sermawo** | |
| **sermemik** | serê çiçikan |
| **sermeqlaç** | telqocik, serqilopanî |
| **sermezin** | kesê serî vala ku xwe mezin rave dike |
| **sermiyan** | pêşî, sermiyanê malê, sermiyanê gund |
| **sernedî** | yê ku her heye û jê re pêsî nîne |
| **sernerm** | kesê ku gotin bi serê de diçin |
| **sernermî** | gotin bi serî de çûn |
| **serpas** | servekirî, ne porkirî |
| **serpene** | darikên ku di bin şivên mewên rezan de dadicikînin da ku hoşiyên tirî negihin erdê. Me serê xwe serpene kir. |
| **serpê** | xwarina ku ji ser û pêyan çê dikin |
| **serpilkî** | di ser re, bê ku lê hûr bibî, kurt û murt |
| **serqot** | sergul, sergoh, tiştek nedan serê xwe, serqot û qirqot |
| **sersal** | serê salê, yekê meha çille |
| **serserî** | kesê ku jê re rê û armanc nîne û her carê bi awakî an bi hinan re dide û distîne |

| | |
|---|---|
| **sersem** | gêj bê raman |
| **sersing** | ji bo xweşmana memikên jinan ew qalibê ku datînin ser çiçikan |
| **sersot** | êzînqê ku serî vêdikeve û dawî hîn vêneketiye |
| **serşeh** | |
| **serşok** | heman, cihê ku tê de serê xwe dişon |
| **sert** | hişk |
| **serta** | navçitilk, sertayên sipîndarê, tayên serî |
| **serteşî** | kurmekî ji kespikê biçûktir û serê wî wekî teşiyê ye |
| **sertil** | |
| **Sertî** | hişk bûn |
| **serûber** | tefsîlat, divê tu çîroka xwe bi ser û ber bêjî |
| **serûk** | paçê ku jin bi ser çavên xwe de ber didin |
| **serwer** | |
| **serxweş** | kesê ku ereqê dixwe û gêj û sersem dibe |
| **serxweşî** | ji ber vexwarina ereqê gêj û sersem bûn |
| **serxwînk** | teyrek e, tirk jê re saqa quşî dibêjin |
| **setimandin** | li cihekî asê kirin, qerase kirin |
| **setimîn** | li cihekî an deverekê asê bûn an qerase bûn |
| **setirandin** | dagirtin, tijî kirin |
| **setirîn** | hatin dagirtin, tijî bûn. Min gelek xwar, û mîda min setirî. |
| **setme** | |
| **sewal** | hemî dewarê çarling ê kedî |
| **sewander** | |
| **sewdeser** | giroveriya serî |
| **sewgirandin** | têxistina hem da xwe, min ew tişt sewgirandiye. |
| **sewik** | somik, çorek |
| **sewîl** | şerbikê avê |
| **sews** | gêj, bêhiş |
| **sewsî** | gêjbûn, bêhisî |
| **sexil** | ji berê kesên biçûk re tête gotin |
| **sexme** | |

| | |
|---|---|
| **seyandin** | dûyin |
| **seyavik** | seyav |
| **seyd** | nêçîr, raw |
| **seyda** | mamosta, ustas, baş zana |
| **seydik** | rojên bi berf ku tê de nêçîr xweş dibe. îro seydik e. |
| **seydvan** | nêçîrvan |
| **seydvanî** | nêçîrvanî, raw kirin, ew kar |
| **seyran** | ji bo kef û xweşî yê bihar û havînan çûna çolê. Di newrozê de hemî kurd diçin seyranê. |
| **sê** | jimara 3, sê ga, sê masî |
| **seyrangeh** | cihê ku ji bo seyranê derdikevinê |
| **sêfîl** | perîşan |
| **sêfîlî** | perîşanî |
| **sêkuh** | cihê ku serê sê newalan tê de dighê hev |
| **sêl** | ji bo pehtina nan li ser ji hesin û berê ji kevir dihate çêkirin, nanê sêlê |
| **sêlax** | sêloq |
| **sêlik** | qûma ku bi lehiyê re tê û dikeve şaxa çeman |
| **sêlînok** | sêline. şîpane, selûn, şîpa pêşiya derî |
| **sêlmî** | |
| **sêlm** | |
| **senc** | Perçîn,dirihên ku didin dora bexçe bostan û zeviyan.Werzên me bi sênc in |
| **sêndir** | |
| **sênî** | Firaqa vêl û fireh ku tê de vexwarina ziwa dixwin |
| **sêp** | |
| **sêpik** | |
| **sêpil** | Cihê ku hergav yek diçê.Sêpila wî filan qehwe ye |
| **sêpî** | Dare ku mirov pê de darve dikin ,sêpî:dare ku pê de dew dikin |
| **sêşem** | Yek ji rojên heftê |
| **sêv** | Celebek meywe,sêvan Meletiyê baş in |
| **sêvik** | Sere hestiyê ron ê jorin û girover |

| | |
|---|---|
| **sêvsêvok** | Celebek giya ye berê wan bi qasî mezeyane û tê xwarin |
| **sêvtirş** | Sêvên ku li çolê dibin û gelek tirş in. |
| **sêw** | |
| **sêwelk** | Biçûkê ku li şeqam û kolanan bê edeb mezin dibe. |
| **sêwero** | Sê rojî,ji sê rojan carek |
| **sêwî** | Bê dê an bê bav,filan ji bav û dê sêwî ye |
| **sibat** | Gecok,meha zivistanê a dawiyê.gurê sibatê |
| **sibande** | Kevî kêlek |
| **sibe** | Roja piştî îro ,sibe ne du sibe diçim bajêr. |
| **sibehî** | sibê, serê sibê, kubara sibê, berî rojê, destê sibê, piştî rojê. berbang : şefeqê, sariya sibê, berî şefeqê |
| **sibetir** | du sibe, roja piştî dibe, Sibetira wê rojê ez hatim. |
| **sibîl** | qelûn, şîv |
| **sicade** | mehfûr, xalî |
| **sidan** | |
| **sidandin** | ji bo çêkirina caw derî pêkanîn û bi ser masûran xistin |
| **sidê** | beredayî xwe mijulkirin, westandin. Filan canê xwe sidê dike, sidê sidê. |
| **sipêdê** | |
| **sifarker** | kesê ku firaxan spî dike |
| **sifik** | devê wî bê sifik e. |
| **sifirkel** | perçînkirina firaxên baqirî. me teşta xwe sifirkel kir. |
| **sifn** | |
| **siforî** | sivorî, simore, heywanekî ji pisîkê biçûktir û sorik e li ser daran dijî û ji gûzan pir hez dike, |
| **sifre** | xiwan, xirêf, sifra filankes çil gavî dirêj e, |
| **sifrî** | |
| **sift** | sam, bihna kirêt ku ji tiştekî tê, filanê bihna siftê jê tê |
| **sifto** | bihnketî, girara we sifto bûye, yanê bîhna siftê jê tê. |
| **sigare** | titûna ku di nav pel de dipêçin û dikêşin |
| **sigûm** | rûtirş, filan bi sigûme ye. |
| **sih** | siha dare. Me xwe da ber sihê. |

| | |
|---|---|
| **sihê** | sî, jimara 30 |
| **sihbet** | bi hev re xweş dan û standin. Sihbetek baş di navbera wan de heye. |
| **sihet** | xweşiya laşê |
| **sihik** | sîrke, sêk |
| **sihir** | çav xapan, ecêb kirin |
| **sihirbaz** | kesê sihiran dike, çavê xelkê dixapîne |
| **sihr 1** | sihra wî ketiye, |
| **sihr 2** | dara bê ber |
| **sihrik** | |
| **sihûrok** | mehên ku jimara wan sî roj in |
| **sik** | |
| **sike** | |
| **sikir** | bend |
| **sikum** | ser û çavên mirov |
| **sil** | rû bi tirs, dil nerûniştî. Wî dema em dîn sil bû û xwe da alî. |
| **sill** | bi derketina mirov an dewêr ya carekê, silla gû, silla rexê |
| **silav** | bi dostanî deng li yekî kirin, sibe xweş, roj xweş, êvar xweş, silav lê kirin, silav lê vegerandin |
| **silbûn** | tirs lê xuya bûn, dil cî negirtin. Tiştek tine bû ne hewceyî wê silbûnê bû. |
| **sîleh** | çek, tifing, şeşar, sûr, xencer |
| **silik** | kesê ku sil dibe û xwe datîne |
| **silisat** | civîna komên mêran li ser hev |
| **silk** | silkok, pincarê ispanax |
| **silop** | silla gû ya gelek mezin |
| **silopî** | navê giyakî ye |
| **silsilk** | tijî lê ne dewisandî |
| **silûk** | |
| **sim** | pêyê dewar cihê hişk, simê hesp, simê ga |
| **simaq** | giyak e, berê wê wek garis, renge sor lê tirş e, tirsê simaqê |
| **simbêl** | simêl, mûyên ku di ber bêvila peyan de şîn tên, simbêl badan |

| | |
|---|---|
| **simbêlbel** | kesê simbêl mezin |
| **simbil** | seriyê genim û ceh ku heban digire. Cehê me simbil girt. |
| **simbêlek** | celebek masî ku jê re tiştekî wek simbêl heye |
| **simidmid** | teyrek e kuliyan dixwe |
| **simitandin** | bi aletekê kunkirin. Min darikê xwe simitand. |
| **simitîn** | bi aleteki kun bûn |
| **simkak** | |
| **simkot** | |
| **simt** | genimê kelandî û kutayî |
| **simtiraş** | aleteke solbend pê simê dewêr qeyar dikin |
| **sin** | serê tehtan ê bilind |
| **sinc** | sincî, celebek dar e, bêhna xwe ji çîçikên wê ên zer tê |
| **sincêrî** | celebek tirî |
| **sincik** | tasika bin zarokan ku têxin dergûşê ji bo nepakî |
| **sincirandin** | bi agir germ kirin |
| **sincirîn** | bi agir germ bûn |
| **sincoq** | |
| **sindan** | |
| **sindif** | ji hesin çê dibe têxin her du lingên dewar û kilît dikin |
| **sindik** | taftî, danê hûr |
| **sinet** | jê kirina pûstikê qamûsê zarokan li nik misilmanan, Min lawê xwe sinet kir. |
| **sing** | darên ku bi erdê de dikutin, singê kon, sixên hesinî ku pê goran çê dikin |
| **singik** | singê hesinî yê tek ku pê kincên rîsinî an dezînî çê dibe |
| **sinhet** | karê ku mirov pê debara xwe dike û tê de jêhatî ye. |
| **sinsil** | |
| **sintir** | sêwiyê bêkes |
| **sinîter** | |
| **sipartin** | bi lawikê hiştin. Min xwe siparte wî. |
| **sipehek** | sipiyên ku ji dar û depan peyda dibin û xwîna mirov dimijin |
| **sipehî** | xweşik, delal, rind |

| | |
|---|---|
| **sipenax** | pincarê silk |
| **sipengeh** | kursiya bilind ku ji depan çê dibe |
| **sipih** | sipî |
| **sipil** | fatreş, silpezik |
| **siping** | |
| **sipiyav** | |
| **sipî** | pir gewr, sipîkirina firaxan |
| **sipîçelok** | |
| **sipîçik** | sipîçka hêkê |
| **sipîk** | sipîka çavan |
| **sipîndar** | darsipî, ji bo dep û maxan bi kêr tê. Maxên sipîndarê gelekî baş in. |
| **sipîroj** | rojên kem ewr û bê baran û bi serma |
| **sipîtahî** | sipî bûn. Sipîtahiya wê ji dûr ve dixewine. |
| **sirr** | serma tuj û hişk sirra sibê. |
| **sirr** | veşartî, ne xuya, Kes bi sirra wî nizane |
| **sirbênek** | sivînek, sivîng. |
| **sirperî** | navê jinan e. |
| **sirûm** | bel bûna guhên bizinê. Ev bizin sirûm e, yanê guhbel e, |
| **sisê** | jimara sisiyan yek, dudu, sisê |
| **sist** | ne xûrt, ne şidiyayî, sisto pista |
| **sisyarik** | sîsyalik, teyrekî leşxwer û mezin, serê wî keçel û sipî ye, dibêjin 300 sal emir dike. |
| **sitan** | li ser hestiyê piştê sitan ketiye, |
| **sitandin** | girtin, bûn xwedî. Me malê xwe jê sitand, Dor jê sitandin. |
| **sitegan** | kasikên çayê ên dîndoqî |
| **sitewiyan** | bûn qîhan. Ev fekî sitewiya ye, ev xwarin sitewiya ye. |
| **sitewr** | ne avis. Çêleka min îsal sitewr e. |
| **sitêlih** | hêja, layiq, Ew ne sitelihê vê yekê ye. |
| **sitirih** | istirî, dirî, riya xebata welêt bi dijwarî û sitirih e, sitirih, sitiro, qiloç, qoç, sitirihên gakovî |
| **sitirih** | giyayê ku jê semix çê dibe |

| | |
|---|---|
| **sitirîmişk** | celebek giya ye, sitiriyên wî gelekî tûj in, piştî hişk dibe têxin devê qula mişkan, nema diwêre derkeve |
| **sitikur** | istikur, beristik, yaxe |
| **sito** | ji binhêla serî heya navmilê |
| **sitoben** | benê ku têxin sitoyê dewar, ê hespan, egal, ê çelekan gergûn, ê berxan gewlik |
| **sitokur** | tevayiya sito |
| **sitiran** | sazbendî, sitiranên Serhedê qelekî baş in, dîlek, beste, bêlûte, bêrîte, lawik, şer, lawij, lavijok |
| **sitirandin** | bi deng dîlok, beste an lawik gotin |
| **sitirîbirk** | darekî du çeqe pê diriyan dibirin |
| **situn** | dar an kevirê ku didin ber ban û qenteran |
| **sitûr** | ne zirav, qalin, xurt, zexm |
| **sitûrî** | xûrti, zexmî |
| **sivde** | aliyê avahiyê ê serhêla derî |
| **sivik** | ne giran, barê wî sivik e, xwinsivik |
| **sivîk** | asraq |
| **sivikahî** | sivikî, negiranî, sivik bûn |
| **sivikbar** | kesê barê wî sivik |
| **sivî** | |
| **sivînek** | sirbênek, sivînq |
| **sivnik** | miştek, qeznik, sezge, şîrtik |
| **sivok** | |
| **sivsivilk** | celebek teyr |
| **siwar** | kesê ku radibe ser tiştekî, ker siwar, hesp siwar, hêstir siwar, lê siwar bûn, lê siwar kirin |
| **siwarxe** | |
| **sixim** | pincikên ku li koka derên birî dertên û şîn dibin |
| **sixme** | serpene, darên ku didin bin şivên, mêvan da ku tirî negihe erdê |
| **sî** | siya ku ji ber pêgirtina royê çar dibe, siya darê, siya dîwêr, |
| **sî** | çermê debax bûyî, sixtiyan |
| **sîk** | bayê hişk û sar sîka sibê |

| | |
|---|---|
| **sîqal** | hillû kirin |
| **sêlewan** | selaq, qûna ku bi lehiyê re tê |
| **sîm** | tayê di rengê şîv de. Min eba xwe sîm kir. |
| **sîmerx** | teyrê enqa |
| **sîmir** | celebek teyr |
| **sîng** | pesîr, ji her du gurmikan heya ser kefçika dil |
| **sînor** | hudûd. Sînorê welatê kurd digehên welatên tirk û ereb û ecem. |
| **sîpe** | xortê ku hîn simbêl derneketine, kerê ku hîn nehatiye bar |
| **sîr** | ew ji keskayiyeke û tûj û bi bêhn e, bi hişkî û terî tête xwarin |
| **sîrav** | avsîr, ew jî xwarineke ji rûn û ava sîrê çê dikin û nan dicîninê û dixwin |
| **sîrik** | sirim, giyakê wek sîrê ye, botî têxin nav penir, penirî sîrik |
| **sîrkut** | darê ku pê sîran dikutin |
| **sîrqwîn** | sirqûn, kesê ku nikare li cihekî raweste, bêhnteng û bê sebir |
| **sîsik** | dendikên biçûk wek yên hêjiran |
| **sîtil** | beroşên mezin |
| **sîtlok** | beroş, tencere |
| **sivanok** | sêvik, sevok, serê hestiyê rehm ku digehê qormîçagê |
| **sîvle** | |
| **sîwan** | darên ku bi ber şita kon de dikutin sîng û sîwan |
| **sîwan** | ji sîwan mezintir ji bo kungî û kulînan bi kêr tê |
| **sîx** | pîj, çi dar çi hesin zirav û ser tuj, sixên kebabê |
| **sîxur** | heywanekî bi sîx e û goştê wî gelekî xweş e |
| **so** | celebek giya ye dikeve nav penîr |
| **soba** | ajnêber, kesê ku sobayiyê baş dizane |
| **sobahî** | ajnê avjenî. Ew xweş sabahiyê dike. |
| **sol** | hemî celebên pelavan, şimik, çarox, filar. şekal, reşik, qalik, sol, mal. Min hespa xwe sol kir. |
| **solbend** | nalbend |
| **soldirû** | kesê ku solan pîne dike |
| **solîn** | çîmenên bi gul û çîçek |
| **solker** | kesê ku solan çê dike, goşkar |

| | |
|---|---|
| **soqî** | conî, cihê ku tê de dan dikutin |
| **sor** | rengê xwînê û tarî û vekirî |
| **sorahî** | sorî, sor bûn |
| **soranî** | celebek xencer ku xelkê soran werdigirin |
| **soravik** | renqîsor |
| **sorboz** | rengekî hespan, gewrê ku yektayên sor di nav de bin |
| **sore** | rengê berve sor |
| **sorevîçik** | serê rûviyê ku digehê qûnê |
| **sorgul** | qomoyî, celebek genim |
| **sorik** | nexweşiyek zaroyan e. Vî zerokî sorik bi derxistine. |
| **sorik** | celebek garis, garisê sorik, gilgil. sorik, lûlika xwarinê ku ji dev digehê aşikê |
| **soring** | celebek dermanê sor an axa sor e. pê pêz reng didin |
| **soryaz** | lûşk, şelqedim, celebek pincar e, têxin ber savarê jî |
| **sorzendel** | zerê renge sor |
| **sosin** | çîçekek çak e û li çiyan şîn dibe |
| **soten** | şewate, hemî, tiştê ku pê germî çar dibe, gaz, benzîn, îspirto, dar, rejû |
| **sotik** | ser satê vemirî |
| **sotin** | şewitandin |
| **sov** | xela, îsal zad nehatin dinê sov e. |
| **soxîn** | dawiya paşîn |
| **soz** | gotina ku ji yekî re tê dayîn. Min soz dayê û li gotina xwe venagerim. |
| **sozbir** | kesê ku jê re soz tê dayîn |
| **sozbîr** | kesê ku soza xwe ji bîra nake, filan sozbîr e. |
| **sozda** | kesê ku sozê dide |
| **suxre** | bêgar, bê ku heq û cemeke bidî xebitandin, sixra axê |
| **suxte** | kesê ku diçe dibistanê dixwîne, şagird, telebe |
| **sû** | xeyd, bi sû hatiye, li me bi sû ye. |
| **sûc** | guneh, qebehet, ne sûcê min e, ev sûcê kê ye? |
| **sûk** | çarşi |

| | |
|---|---|
| **sûke** | ronahiya ku di sahiyan de bi dest xwe digirin û di sûkê de dimeşin |
| **sûlav** | avşar, ava ku di bilind cihan de tê xar, şelale |
| **sûle** | qamîşê ku li şûna darik têxin qelûnê |
| **sûme** | asegehên ku di bilindcihan de bikevirên mezin û hişkeberê çê dikin |
| **sûn** | tûj kirin, min kêra xwe sû, bivrê min bisû. |
| **sûp** | |
| **sûr** | dîwarê ku li dor bajar an gundekî tête çêkirin |
| **sûret** | serçav resim |
| **sûs** | çiyakî bilind û perên wî bi şîvikin ji koka wê şerbetek tête çê kirin |
| **sûsik** | celebek kew e, ling û dimkê wî zer in |
| **sût** | rût, tazî bêpar ji hemî tiştên qenc. Ew ji namûsê sût e. |
| **sûtal** | sûtar, kesê ji û şeref û namûsê sût |
| **sûtin** | tûjkirin, sûtina kêrê |

# Ş

| | |
|---|---|
| **şa** | şad, dilxweş, ez bi dîtine te şa bûm. |
| **şabaş** | sipas |
| **şafir** | giya yê bilindê ku di nav avzêman de şîn dibe û kes nikare bi nav de biçe |
| **şagirt** | suxte, talibên ku diçin dibistanê |
| **şahîk** | hillî, şût |
| **şahîn** | teyrekî gewr û biçûk, lê nêçîrvan |
| **şahînet** | şayî, ji bo kesekî an tiştekî an cejnekê kêf û xweşiya ku tête kirin |
| **şak** | bi kêr hatî, filan xortekî şak e. |
| **şal** | cilê ku bi ser derpê de li xwe dikin |
| **şalûl** | şehlûl, şalûr, teyrekî biçûk û pir reng e, meşhir guvan dixwe |
| **şamoyî** | |
| **şamûz** | samûs. serhişkên dewar, hêstira şamûz |
| **şan** | şeref û bilindî |
| **şanazî** | dilgirî. iftixar. Ez bi te şanazim. |
| **şandin** | şiyandin, hinartin, ji cihekî şêkirina cihekî din, min tiştê wî jê re şand. |
| **şandî** | kesê ku tête şandi n |
| **şanî** | şanî dan, rave, şanî dan: rave kirin. min senî wî da. |
| **şanzdeh** | jimara 16an |
| **şap** | |
| **şape** | renî, çix, berfa ku biharê li bilind cihan dadikeve û dar û ber li xwe re dadixe newal û geliyan |
| **şapik** | li şûna çaket bi ser kurtik de li xwe dikin |
| **şalşapik** | cilên kurdî, ji şal û şapik digehên hev, çeşîtên wan ev in: bekirbegî, osmanbegî, bîrkehî, binefşî, mirîşkî, êzdîn şêrî, seyfikî, gula şaxê, bazanî, semawî, textê benefşî, sitokew, qacîtî, sêmekûk, çarmekûk, pênc mekûk, saya madanî ... |
| **şaqût** | |

| | |
|---|---|
| **şaqûl** | şangar, wek kevan ji şiveke nerm û benekî şê dibe û li ser dar û dirikan tête danîn û pê çivîkan digirin |
| **şar** | bajar |
| **şaran** | |
| **şargeh** | cihê ku mirov ji bo demekê ji xwe re dike war û tê de dimîne |
| **şarmot** | |
| **şaş** | xelet, xwehr. Ez di vê kirê de şaş bûm. |
| **şaşik** | paçê sipî ku mela didin sere xwe |
| **şaşî** | şaş bûn, xelitîn |
| **şaşkirin** | xelitandin, rêya rast li ber winda kirin |
| **saşxapîn** | kesê ku xelkê şaş dike û dixapîne |
| **şaw** | şehw. rê û kortalên di nav û ser tehtan de |
| **şax** | hêlek an hinek jê ku ji kokê dertê. şaxa dare: tilayê girs, şax: qilaçê kovî. şaxek esker, birek ji esker veqetî |
| **şayed** | heke ku, şayed ku ew nehat ez dê bêm. |
| **şayeste** | hêja. layiq |
| **şeb** | şew, celebek xwê ye ji bo debax û hin dermanên din bi kêr tê |
| **şebak** | |
| **şebikandin** | ji serman an ji westan dest û ling xistin hev |
| **şebikîn** | ji westan an serman dest û ling ketin hev |
| **şebîk** | |
| **şebot** | celebek masî |
| **şefeq** | berbang, şefeqa kûr |
| **şeft** | xet û xezên di caw de |
| **şeftel** | |
| **şeh** | şeyê ku pê por şeh dikin. Min porê xwe şeh kir. |
| **şehar** | di çiyan de cihê ku lat û zinarên mezin di rex hev de |
| **şehbaz** | nave, bazê şehan, mêrxasê serdest. filan şehbazekî mêran e. |
| **şehbelût** | kestane, meyweyek li darên berûyan ên aş lê kirî ve dibe, berûyên mezin |
| **şehdane** | heb an liba mezin |
| **şehde** | sehdetî. şahidîtî. jê re şehde dan, lê şehde dan |

| | |
|---|---|
| **şehitandin** | hilweşandin |
| **şehitîn** | hilweşîn |
| **şehîn** | hişîn, hîrrîn, dengê hespan, hesp şehiya, şehîna hesp |
| **şehkirî** | tiştê ku tê şehkirin. kevirê şehkirî, hiriya şehkirî |
| **şehmar** | kurmekî dirêjî bi jehr û pirling e |
| **şehmêr** | peyayê camêr û bi rûmet |
| **şehnedêr** | qada ku pirtal tê de tête ravekirin û guhartin |
| **şehnik** | li ser û çav û laşên mirov tên wek nokan an biçûktir, reng reş e |
| **şehmig** | befşik, ferş, pişta pê cihê bilind |
| **şehnişîn** | şehleşîn. cihê rûniştina sah, di avahiyên kevin de hin cih ne wek balkanan bi derve; lê bi hundir ve ji mezelan cida bi depan dihate çêkirin |
| **şehreza** | jîrek, jêhatî. çav vekirî. medenî, filan geleki şehreza ye. |
| **şehrikêb** | |
| **şehne** | kesê ku diçe ser gundan û wekiliyê dike û benderan resim dike |
| **şeht** | |
| **şek** | şivîşk, ez li vî tiştî bi şek im. |
| **şekal** | sola peritî, bêkêr |
| **şekir** | sipî û şêrînê ji giya tête çêkirin |
| **şekirandin** | şekir kirin. Nanê min bişekirîne |
| **şekirîn** | wek şekir, gotinên wê şekirîn in. |
| **şekirok** | hemî celeb şekirên ku ji bo xwarinê çê dikin |
| **şel** | taca derziya biçûk, tayê dirûtinê |
| **şelb** | lêdan. bobelat, min şelbek lêda. şelbek bi serê wan de hat. |
| **şelengo** | celebek keskayî ku tête xwarin |
| **şelepe** | şelepele. berfa bi baran, berfeşo |
| **şelik** | |
| **şelipandin** | terişandin, min dehpek dayê û lingê wî şelipand. |
| **şelipîn** | terişîn, lingê min ji teht şelipî û ketin. |
| **şeliqandin** | ji pir rêçûnê bi ser ve birina çermê |
| **şeliqîn** | ji ber xwêdanê bi serveçûna çerm |
| **şelixandin** | ji ber guh nedanê xira kirina dew, wan dewê me şelixand. |

| | |
|---|---|
| **şelixîn** | ji ber guh nedanê. xira bûna dew. Dewê me şelixî. |
| **şelm** | |
| **şelpe** | derb. hing, te şelpa mêran dît. |
| **şelt** | rûyê qelt an doşekê ê bin. nivînê me şelt in yanê bê rû ne. |
| **şelte** | nivîna bê rû |
| **şelûf** | |
| **şemas** | ji keşe biçûktir di dînê mesîh de ritbeke biçûk |
| **şemase** | |
| **şembilêlk** | |
| **şem** | |
| **şemî** | roja piştî înê |
| **şemirandin** | rê li ser winda kirin, bi ser ve ne bûn |
| **şemirîn** | bi ser ve nebûn |
| **şemitandin** | filitandin, jê çûn, me lingê wan şemitand. |
| **şemitîn** | filitîn, xuj bûn. Destê min li kevir şemitî. |
| **şemixandin** | |
| **şemixîn** | |
| **şemşaq** | bi derew û qellaşî serê yekî mezin kirin û dilê wî xweş kirin. Ew jê re şemşaqan davêje. |
| **şemşîlik** | çemlûlik, zivistanê ji ber serma xurt ava ku bi şikeft û sevînekan de dilop dike û li pê hev hişk dibe û dibe daq, wek dîndoq dibiriqe |
| **şeng** | sivik û çeleng |
| **şepal** | celebek pilingên biçûk, fehd |
| **şepne** | |
| **şeq** | kerî, min dar kir du şeqan. |
| **şeqal** | sola kevin, şekal |
| **şeqam** | kolan, dexil, mala me di filan şeqamê de ye, |
| **seqem** | şelmaq, sîle, lep, min şeqemek lê da. |
| **şeqil** | reşme, kada ku pê zad nîşan dikin. Me bêndera xwe şeqil kir. |
| **şeqilker** | kesê ku şeqilê bi dest xwe digire û bênderan şeqil dike |
| **şeqtandin** | bi ser ve anîn, li ser jêkirin. Me cilên wî jê şeqitandin. |
| **şeqitîn** | jê qetîn, jê ketîn, li ser çûn |

| | |
|---|---|
| **şeqledew** | dewê tîr, an mastê bi av |
| **şeqlemast** | mastê ku avê tevlê dikin û li hev dixin dikin dew, dewê ku nivîşk jê derneketiye |
| **şeqûq** | şeqoq, dara kizwanê ku ber nagire, celebek hirmê ku li çiyan dibin |
| **şerr** | ceng, lec |
| **şerar** | |
| **şerbik** | kûzikê avê ku bi dest tête girtin |
| **şerbet** | ava şekir, an hinguv |
| **şerde** | terbiye, kurê xwe şerde ke ,filan mirovekî bi şer de ye. |
| **şeridandin** | berba kirin |
| **şeridîn** | berba bûn, xelata me şeridî. |
| **şeriet** | rêzana dîn, kitêbên ku rê û rêzana dîn rave dike, şerîeta mihemed |
| **şerît** | werîsê ku ji kêndirê çê dikin |
| **şerix** | |
| **şerjêkirin** | serî birîn, me bizin serjêkir. |
| **şerker** | şeroker, kesê ku ji bo welat an armancekî diçe şer |
| **şerm** | fihêt, filan şerm nake. |
| **şermende** | fedîkar. ez li pêş wî şermende bûm. |
| **şermedar** | şermedar, di ber kireke, xwe ve şerm kirin |
| **şermixandin** | bi nînokan an tiştekî hişk xurandin û çerm bi ser ve birîn |
| **şermixîn** | bi nînokan an tiştekî hişk hatin xurandin û çerm bi ser ve çûn |
| **şermok** | pir bi fihêt. Filan gelekî şermok e. |
| **şeroyî** | |
| **şerpeze** | perkende, perîşan ji hal ketî. Em di rê de gelekî şerpeze bûn. |
| **şert** | li ser tiştekî gotin dan hev. Me bi hev re şert kir me şert danî. |
| **şerûdî** | |
| **şerût** | |
| **şeş** | jimara 6an |
| **şeşaqir** | şeşderb, sileha biçûk ku şeş fîşek an pirtir tê de ne |
| **şeşberek** | xwarineke ji hevîr û goşt û mast, an çurtan çê dibe |
| **şeşik** | a şeşan, ê şeşan. Em revîn ez şeşik bûm. yanê ê şeşan derketin. |

| | |
|---|---|
| **şeşlobe** | kesê ku bê raman û girs û sitûr dipeyive û dixwaze bi gotinê xwe têxe çavên xelkê |
| **şeşperî** | periyên ku ji şeş perçan digehê hev. Tevgera bi lez ku her kes nikare, şeşperî diçûn, şeşperî dizivirîn, şeşperî daş dibûn. |
| **şeşxane** | celebek tifingên ku di dev re dihatin dagirtin û şeş xane di hundirê wê de hebûn |
| **şeşvek** | ji şeşan yek |
| **şet** | ji çemekî mezin hinek vediqete dibe şet. Biharê di gelek cihan de şet dikeve ferêt. |
| **şetat** | |
| **şetrenc** | kîşik. li ser depekî bi darikan tête listin |
| **şev** | dema ku ro diçe ava heya rohelat, şev lê geriyan. |
| **şevandin** | şevêdin. berî du şevan, ne şevaçû berî wê |
| **şevbiwêrk** | şevbêrk, bi şev rûniştin. Me şevbiwêrka xwe li mala Cano derbas kir. |
| **şevçira** | madeneke bi şev ronî dide |
| **şevder** | bi şev li der man, şev li derî malan li çolê derbas kirin. Em şeva din şevder man. Îşev pezê me şevder bû. |
| **şevdest** | nêçîra kewan a bi şevê, çi karekî piştî nîvşev bête kirin. Em çûn şevdestê me şevdest kir. |
| **şeve** | term, kabûs, ew halê ku bi şev li mirov diqewime |
| **şevereş** | şeva ku tê de ronah iya hîvê nebe |
| **şeverê** | şiverê, şifarêk. rêyên ku dewar nikare pê de biçe, tinê peya dikare tê re biçe |
| **şevgêr** | şevger, bi şev rê şaş kirin û gêj bûn. Filanê şev lêgeriya an sevqerî bû. |
| **şevîn** | bi şev li çolê li nik dewar man. Em çûn şevînê. |
| **şevînî** | çûna sevînê, şevînî li ber çem e. |
| **şevkor** | kesê ku bi şev çavên wî nabînin. taqranî |
| **şevistan** | mezela ku şeva pêşîn têde zava diçe cem bûkê |
| **şevreng** | rengê şevê |
| **şevrengî** | tariya ber çavên dil |
| **şevreşî** | şeva tarî û reş ku ji ber hebûna ewran mirov ber xwe nebîne, wek şevên zivistanê |

| | |
|---|---|
| **şevrevink** | sevşevok, çil, çilêçilê, şevrevok, perçêmik |
| **şevronk** | şeva cejna êzdiyan ku heya sibê rûdinin |
| **şevtirandin** | berî sê şevan |
| **şewat** | dû şewat hene, yek şewata bi agir, yek şewata bi derd û kulan, şewata dil, şewata pirtal |
| **şewb** | nexweşiyeke ji zad çar dibe, serî digire lê heb nagire. Genimê me şewb pê ket, an şewbî bûye. |
| **şewibîn** | ji ber sewbê sere zad heb negirtin, şewibina zad |
| **şewilandin** | ronî kirin. veciniqandin |
| **şewlik** | newalokên di nava bilind cihên çiyan de |
| **şewilîn** | ronî bûn, veciniqîn, tirsîn |
| **şewl** | ronî, şewla çirê, şewla agir. |
| **şewl** | newalên di bilind cihên çiyan de |
| **şewitandin** | sotin. me mala wî şewitand. |
| **şewitîn** | hatin sotin. em şewitîn. |
| **şewk** | bişkocên mezin |
| **şewkandin** | bişkoc kirin |
| **şewq** | şewl, ronî |
| **şewt** | |
| **şexf** | |
| **şeyinandin** | tetbîq kirin, şeyinandina qanûnekê |
| **şeyind** | tetbîq |
| **şeyindar** | kesê ku şeyind dike, tetbîq dike |
| **şeyinandî** | tetbîq bûyî. ev qanûneke şeyinandiye. |
| **şeyinîn** | tetbîq bûn. Şeyinîna vê qanûnê hewceyî xurtiyê ye. |
| **şeylo** | şêlo, şêlî, li hevketî. ne zelal |
| **şeytan** | dêwê kor, hevalê şer |
| **şeytanok** | heywanekî biçûk e di nav qalikeki gewr û girover de ye, ewrûpî wî dixwin |
| **şeytik** | rewtik |
| **şêlandin** | tazî kirin. mal û pirtalên yekî li rê jê sitandin. Karê keleşa, şêlandina rêwiyan e. |

| | |
|---|---|
| **şêlim** | keskayiyeke payizê dibe û wek dîwan lê gewr in û reng tûj in |
| **şêlîn** | hatin şêlandin |
| **şêmî** | |
| **şên** | ava. Ev gundî şên e. Ev mirov şên e. mirovê şên, kesê dilava û xweşpeyv û bi henek e. |
| **şênahî** | şênî, ava bûn, şên bûn |
| **şênig** | pêşiya derî, şêniga me dikeve pişt mala Welo. |
| **şênik** | birek tifing, bi hev re berdan. Me şêniyek da neyaran ji hev belav bûn. |
| **şêr** | padîşahê dirinde |
| **şêrane** | wek şêran |
| **şêranî** | hemî xwarinên ku ji tiştên şêrîn çê dibin |
| **şêrazî** | |
| **şêraz** | kesê ku şêran dilîstikîne, li ser vê her kesê ku kirên li bela dike |
| **sêrêz** | giyayeke bi ardê wî kaxezan an çerm bi heve dinûsikînin |
| **şêrîn** | çi xwarina ku tê de şikir, mot, an hingiv hebe, an tama wek wan lê bê. Şekir şêrin e, hingûv şêrîn e. |
| **şêst** | jimara 60î |
| **şêt** | çita ku ji çirpiyan çê dikin û pê şikeftan ji bo pez û sexil por ve dikin |
| **şêwr** | pirsîna fikrên hev ji bo kirekê. Em bi hev şêwirîn û paşê me kir. |
| **şêwirdar** | kesê ku pê sêwir dibe. Filan şêwirdarê me ye. |
| **şêwirîn** | şêwirkirin |
| **şibhe** | şik, şivîşk. Ez li wî şibhe dikim. |
| **şibrî** | qufika tirî a mezin ku didin ser dewar |
| **şid** | badanek, pêçek kêşek. Şidekê bidê. |
| **şidandin** | pêçandin, lê gerandin |
| **şidîn** | lê hatin pêçan |
| **şif** | kevî, kêlek, kevirên serder û binderê |
| **şifa** | |
| **şifihan** | şifîn, helan |
| **şifihandin** | helandin |
| **şift** | şûtî, zebeş |

| | |
|---|---|
| **şihir** | rojên ku tê de mesihî serdana hev dikin |
| **şijî** | rijî, ava ku li penirê nuh dadikeve |
| **şik** | sibhe, şivîşk |
| **şikandin** | kerî kirin, wî kasik şikand |
| **şikarte** | çandiniya ku ji du sê kîsan ne pirtir be. Min şikareke xwe çand. |
| **şikbir** | bîrbir, hîlenas jîr |
| **şikeft** | cihê ku ji bo rûniştin û jîna mirov di keviran de hatiye kolan. berê: di çiyayan de cihê ku wek şikeftan lê ser vekirî, qefa |
| **şikestek** | gayên mezin ku pê avê li cihekî heya cihekî dibin |
| **şikestin** | kerî bûn, perçe bûn. şikestina dep, şikestina dar |
| **şikev** | firaxek kûr û mezin e ji axê, an kevir çê dibe û tê de xwarinê dixwin |
| **şikeva** | bê hevirtirş. nanê şikeva |
| **şikevik** | şikeva biçûk |
| **şikevlat** | |
| **şikênandin** | şikandin, kerîkirin, li xwe şikênandin, qels û yar bûne |
| **şikêr** | dewara ku bê serjêkirin dimire, fitisê, nayê xwarin. Ev çêlek şikêr çû. |
| **şiker** | di çiyan de girên ku ji lat û zinarên mezin tê pê, ji kiloşk biçûktir |
| **şikêvlatok** | şikêvlatok, kusî |
| **şikil** | kesim, qed şikilê wi baş e. |
| **şil** | av lêketî, av an tiştekî ron bighê |
| **şilahî** | şil bûn, şilahiya axê |
| **şilak** | şilek, erd, dîwar an çi tiştê ku ji ber avê renge şil xuya dike |
| **şilav** | avzêm, erdê ku av tê dizê li naherike |
| **şil** | şeht, bi destekî qop |
| **şilêl** | |
| **şilf** | rût, tazî, şilfê şûr, şilfê xencerê, ew şilf û tazî bû. |
| **şilik** | nanê bêhevîrtirş |
| **şilikî** | nanê ku li ser sêlê bi rûn dipêjin û şêranî lê dikin û dixwin |
| **şilkak** | |
| **şiloke** | |

| | |
|---|---|
| **şilor** | şilale, gulîr |
| **şima** | pap û gemara hinguv piştî helandinê |
| **şimamok** | petixê biçûçik wek sêvan ku bêhn dide |
| **şimaron** | |
| **şimik** | salên dawî vekirî ku di nava malê de têxin lingê xwe |
| **şimtî** | hindiwane, şiftî, Şûtî, zebeş |
| **şindok** | serê memikan ê girover. Zarokê har, şindokên diya xwe gez dike. |
| **şinik** | mistkeçûn, ew peyayê ku dûrv û kirên wî wek jinan be |
| **şipinandin** | şipme kirin, bi şipne kesên axê rast kirin |
| **şipne** | ew aletê ku piştî reşandina tov pê axê rast dikin heya teyr û çivîk nexwîn |
| **şiqam** | şeqem, şelmaq, sîle, lep. Min şiqamek lêda. |
| **şiqaqî** | |
| **siqen** | |
| **şirab** | darê ku pê deriyên kevin dihatin girtin û vedibûn şarmalix |
| **şirik** | çirik, dar an tenekeyê ku ava serban tê re dadikeve |
| **şirîk** | kesê ku ji bo xebatekê bi danîna para xwe ya mal û xebatê dibe heval |
| **şirn** | qîllê beraş, şirmê beraş |
| **şirşar** | sûlava biçûk |
| **sirşir** | dengê avê ku ji cihekî bilind dadikeve. Baran dibare, şirşira avê ye bi sirrikan de tê. |
| **şirtik** | |
| **şitexalî** | peyv, şitexaliya wî ne baş e. |
| **şitexlandin** | peyivandin, bi gotin dan, pê gotin kirin,şitexlandina wî ne ew çend baş e. |
| **şitexllîn** | peyivîn |
| **şitil** | çêjikê daran an yê hin şînahî |
| **şitilandin** | şitil danîn, me erdê xwe şitiland. |
| **şitilîn** | şitil bûn, ev erd şitiliye. |
| **şitiyar** | razan, ma ew şitiyar e? Ma ew rezeyî ye? |
| **sitiran** | |

| | |
|---|---|
| **şitû** | |
| **şitûk** | |
| **şiv** | darê zirav ku bi dest xwe digirin |
| **şivan** | şiban, kesê ku diçe ber pez û bi pez re şevder dimîne |
| **şivik** | şiva ziravtir û biçûk |
| **şivin** | xezala ku qiloçê wê bi çeqel be |
| **şivarê** | |
| **şivîle** | şeverê, şifarêk |
| **şivîn** | şevîna pez |
| **şivîşk** | şibhe, şek, ew sivîskiyan li me dike. |
| **şixre** | darê ku pê sapê zad dikêşin |
| **şixrebîn** | şixrekêş, şixrevan, kesê ku şixran dikêşe |
| **şixab** | hesinê birxiya ku pê dar û depan an hesin kun dikin |
| **şixul** | kar, xebat. Ez bê şixul mam. |
| **şixulker** | karker, xebatker |
| **şiyan** | qadir bûn. Ez şiyanî vê yekê me. |
| **şiyar** | çavekirî |
| **şiyare** | şiyar bûyî. Filan peyaki şiyare ye. |
| **şîj** | ava zer a ku ji birînan tê |
| **şîjik** | ferşik, sişik, giçik, xîçil, xilikên biçûk |
| **şîlan** | dareke berav e ku pêve celebek gul dibin |
| **şîlav** | malzaroya pez, ji bo havînê penîr jî bi kêr tê |
| **şîle** | zepe, tevlîhev, xwarineke ji savar û nîskan şê dibe |
| **şîlik** | şînik, tehtik, di eniyê de navbera cih qiloçan. Min darek di şîlikê eniyê de lêda. |
| **şîn** | rengê şîn, hesîn |
| **şîn** | xem girtin, dil êşandin li ser miriyan, şîn girtin, şîn girêdan, |
| **şîn** | karîn, qudret, ez dişêm, tu naşê. xweşî şîn û zanîn û vîn û kelam, bihistîn di gel dîtinê bû temam. |
| **şînayî** | şîn bûna dar û giya. Biharê dinê tev dibe şîoeyî. |
| **şînbûn** | derketina dar û giya ji erdê. Zadê me şîn bû. Dara min sîn bû. |
| **şîne** | rengişîn, wek şîn, nîzîkî rengê şîn |

| | |
|---|---|
| **şîp** | tal, dûş, tîra pêla ava çem, sîpa avê |
| **şîpane** | sêlûn, peşiya mezelê di nava xanî de. şîpaneya mezelê |
| **şîr** | ava sipî ya ku ji guhanê pez û dewar tê û jê mast û rûn û penîr çê dibe. Ji şîr kirin. |
| **şîrdan** | dana şîr |
| **şîrdank** | elbika ku tê de şîr didoşin |
| **şîrqerm** | hindikekî germ |
| **şîrmij** | zarokê ber şîr |
| **şîret** | nesîhet, Wî gelek şîret li min kirin. |
| **şîş** | tîra hesinî ku pê nan werdigerînin perçê hesinê ku zirav û tûj |
| **şîş** | genimê ku bi diştar dihêrin û jê kutilkan çêdikin |
| **şîsan** | |
| **şîşek** | |
| **şîşman** | kesê qalind û sitûr û zikmezin |
| **şîşmanî** | şîsman bûn, şîşmenî ne tişteki baş e |
| **şît** | şipil, sivik, şeng |
| **şîtil** | |
| **şîv** | xwarina ku piştî roava tê xwarin |
| **şo** | dengê ku pê qazi sehan dikin, şo şo şo |
| **şob** | |
| **şoker** | kesê ku bi dengê şa gazî sehan dike |
| **şekerî** | hevaliya kesên ne camêr kirin û bi gotinê bi wan re dan û sitandin |
| **şol** | xebat, şixul |
| **şolav** | xwarina ku li ber mirov dimîne |
| **şolik** | |
| **şom** | bêyom, nehs |
| **şomî** | bêyomî, nehsî |
| **şonik** | şûnik, depê ku kin pê tên kutan |
| **şop** | rêç, şopajo, rêsajo |
| **şopajo** | kesê ku rêçê dajo |
| **şepik** | şûrik, zornalix, dar an hesinê ku pê derî tête girtin |
| **şoqil** | |

| | |
|---|---|
| **şor** | pir xwê. şîva me şor bûye. |
| **şorr** | peyva xweş û bi tam. Were em şorran bikin. |
| **şorav** | sûravk, ava şor ku xwê têxinê, an ava ku di erdê bi xwê de bi dertê û ji şorî nayête vexwarin. Ev bîr şorave. |
| **şorrax** | rengeşor, xwarineke ku hinekî zêde bi xwê |
| **şorbe** | xwarineke ron, şorba dew, şorba nîskan, şorba rişê |
| **şorre** | guherçele, rêça kevokan ya kevin |
| **şorrek** | erdê bi xwê ku giya tê de şîn nabe |
| **şorik** | sûrav, av xwê, av şor |
| **şoş** | kesê bê nefs ku li pê her kesî dixwe û çav li destê zengîn û dewlemendan e |
| **şoşî** | şaş bûn |
| **şoşpan** | kesê ku zavê dibe gerdegê, an go ber derê bûkê |
| **şostirme** | du perçeyên ku bi tiştekî digehînin hev û dinûsikînin |
| **şûf** | nihêrek, menzere. şûfa wî ne çak e. |
| **şûjî** | ava ku ji penîr tê |
| **şûjin** | derziya mezin ku pê kîsan didirûn |
| **şûm** | beredayî, bi teşxele |
| **şûn** | cih, şûna wî ne eve |
| **şûnwar** | cihê waran |
| **şûr** | silehê ku pê şer dikirin |
| **şûrbaz** | kesê ku baş dizane şûr bişixulîne. şêrwan, sûrbazin |
| **şûrbazî** | şûrbaz bûn |
| **şûrkêş** | mêrxas yê ku di kişandina şûr de jêhatî. Bila şûrkêş bidin pêş. |
| **şûrik** | şapik, şûvik, zarnalix, dar an hesinê ku pê derî digirin |
| **şûrkeşî** | şûrkêş bûn mêrxasî |
| **şûş** | şûtik, zirav ku dikare di her cihê re derbas be, xwe sûş kirin, şûşbûn: bi şivikî di cihekî re derbas bûn |
| **şûşe** | firaxa dîndoqî devteng. şuşa avê, şûşa ereqê |
| **şûştin** | ji qirêjê paqij kirin, min laşa xwe şûşt, ew cilên xwe dişo, xwe jê şûştin. |
| **şût** | paqij, şahîk, hillû. Wî porê xwe şût kiriye. Ji namûsê şût, bênamûs. Ew ji namûsê şût e. |

| | |
|---|---|
| **şûtik** | benê wûnandî ku zaro didin pişta xwe |
| **şûtin** | şahîk kirin, şût kirin, vî kevirî bişûtîne. |
| **şûv** | erdê ajotî berî çandinê. Şûva me du gîsnî ye. |

# T

| | |
|---|---|
| **ta** | derzî, vî tayî bi derziyê veke.ta: hêl.Bend, ew ji tayê meye, ta: nexweşiya bi germî. Min ta girt, ta hate min. |
| **tabir** | |
| **tabût** | sendoqa ku miriya têxinê |
| **tac** | serpêça padişahan. taca şah bi gewher e. |
| **tajan** | êş, tivanc, tajanê xwe da dil. |
| **tajang** | qirbac, qamçî, me ên mayî. Bi top û tifing û tajangan ditirsînin. Binêr çi ehmeq in, dixwazin şêran bi fitikê birevînin. |
| **tajî** | celebek sehên nêçîrê |
| **tal** | tûş, dûş, em di tala gund re ji avê raperîn |
| **talan** | şêlandin ji hemî tiştî, mal, pez, dewar |
| **talde** | cihê ku mirov xwe dide ber ji bo parastina ji tiştekî. Baran barî, me xwe da ber talde. |
| **talih** | talik, xefika ku erdê dikolin û ser bi pûş por dikin, feq |
| **talî** | dawî, dongî, talî, em vegerin welêt. |
| **talîş** | perçek, dema koka darekê di nîvî re biqelêşin, her perçek dibe talîsekê |
| **tam** | lezet, tama vê xwarine ne ew çend baş e. |
| **tametam** | cîşît, çîşît, filan xirêfek çêkir tametam tê de xwarin hebûn. |
| **tamijandin** | tiştek bi yekî dan tam kirin û hînê kirin. Te ew tamljand, nema dev ji te berdide. |
| **tamijîn** | ji tiştekî tam girtin û dev jê ber nedan |
| **tamsar** | bê tam, bê mana. Ev xwarin tamsar e, |
| **tamtîtik** | tiştê ku tama wî neçak û beredayî ye. Ev xwarin tam tîtik e. |
| **tan** | |
| **tang** | dûş, tal, di wê tangê re min tifing berdayê. tang: ji pola tête çêkirin û tê de top hene û tekerên wê wekî tiraktoran li ser zinciran dimeşe |
| **tapo** | nivîsandina erd û xaniyan li ser navekî. Min erdê xwe tapo kir, tapoya vî xanî li ser min e. |

| | |
|---|---|
| **taq** | dengê ku ji dar an depeki têt |
| **taqe** | di dîwarên mezelan de ji bo danîna tişt cihê bi çûk ku çê dikin |
| **taqet** | hêle, qiwet, karîn, ji bo hilgirtina vî barî taqeta min nema. |
| **taqî** | cilekî jinane pêşiya wî vekirî û di kelekan de dû tîş tê de hene ku her aliyek dibe dawekê |
| **tar** | ben û tayên dezge ên li ser dirêjiyê, tara bêjingê |
| **tarr** | tol, evd, heyf me tarra xwe ji neyar sitand. tarr:kêşan, min ew di erdê re tarr kir. |
| **tarrçî** | |
| **targan** | |
| **tariotan** | |
| **tarî** | ne ronî, cihê ku ronî negehê tariyê. |
| **tarîbarî** | nîvtarî, berve sibê, piştî roava pêşiya tariyê |
| **tarme** | qenepeya ku ji depan çê dibe |
| **tar û tûr** | tertûr, keskayî, sebze |
| **tas** | badî, zerik, tasa avê |
| **tasik** | tasa biçûk |
| **tatî** | tatik. kulavê yekber ê biçûk |
| **tav** | ronahiya royê, royê tav da erdê, tavdan. tav: pelên baranê ku biharê tên, tava baranê. |
| **tavî** | tavik, ewrên reş ku biharê li ruyê esmên zû çar dibin |
| **tavik** | tava baranê a biçûk |
| **tavil** | zûka di cî de |
| **tavoyî** | birîna ku li ber royê diazire. Birîne min tavoyî bû. |
| **tavzerik** | tavzerk, hingur, di roavayê de zeriya ku digehê ewran |
| **taw** | kês, firset. Tawa wî ket min. Ez bê taw mam. |
| **tawî** | kesê ku ta di laşê wî de cih digire |
| **tax** | tar mihelle, tax:tal, hêdîq, darikên ku wek qasnaxê bêjingê nava wê bi benikan bi heve girê didin û pê li ser berfê bi rê diçin |
| **taxe** | ji pelkên giya demedên ku têne çê kirin |
| **taxim** | sînor, taximê erd |
| **taxok** | hêlî, liyan, lekan, di ser berfê re ji bo kişandina baran an mirovan ji dar û depan tête çê kirin |

| | |
|---|---|
| **taxûs** | zad an kartolên ku piştî xaşandinê dipelixin û dikin xwarin |
| **tavîj** | teja ku gelekî sitûr tête çê kirin |
| **taze** | nuh, ev meywe taze ye. |
| **tazî** | rûs, bê cil û kinc rût |
| **tazîm** | girsandin, mezin nas kirin |
| **teb** | bayê ku tê û toz û dûmanê bi xwe re radike û rûyê erdê tarî dike, ecac |
| **teba** | tişt, madde, rev, çi teba ye? |
| **tebane** | ji bo çêkirina riyan hesinê ku pê erdê dikutin û ax û keviran rast dikin |
| **tebare** | teyare, di ajotina erdê dê ser evleg û bin evleg cihê ku kîsin baş nagire û li ser pehniyê careke din dajon |
| **tebat** | tevat, xwe girtin, temkin, filan peyekî bi tebat e |
| **tebator** | kurmikên wek pîrê ku wek tevnikê li rûyê dar û dîwaran çê dike |
| **tebax** | meha havînê a dawiyê |
| **tebaxçe** | tîniyên ku qehwê li ser belav dikin |
| **tebeq** | tebsiyên ku ji sap çê dikin |
| **teber** | bivirokê ku derwêş bi dest xwe dikin |
| **teberik** | tiştê ku jibo teşkarê ji hinekan tête sitandin |
| **tebeş** | miya ku eniya wê beş e |
| **tebiqandin** | tetbîq kirin |
| **tebitîn** | tevitîn, xwe girtin,temkîn, filan kes peyeki tebitî ye. |
| **tebiet** | xwe kird yê ku xwe anî meydanê |
| **tebkirin** | tep kirin, hîlebaz |
| **tebûr** | debûr, debar, filan miroveki bê tebûr e. Tebûra min ne ewçend baş e. |
| **tedbîr** | tevdîr, filan peyak bi tedbîr e. |
| **teew** | teewî, tawî tewî cele bek fêkî li çiyan dibe |
| **tefan** | tefîn, tefiyan, vemirîn |
| **tefandin** | vemirandin |
| **tefarî** | |
| **tefarik** | tevarik, tewêlek, kesê bê mal û milk ku ji xelkê re dixebite |

| | |
|---|---|
| **tefsî** | tebsî |
| **tefo** | ew aletê ku pê depan rast dikin |
| **teftef** | |
| **tehimandin** | nêremokirin |
| **tehle** | rengereş, ji miyan û mirovan re tête gotin |
| **tehmet** | |
| **tehre** | germiya ku havînê dema nîvro dibe |
| **teht** | perçekî mezin kevir ku li rûyê erdê pehn buyî. kendal: ji axê, rizde: ji kevir û axê, helane: ji bûr |
| **tehfil** | paqij kirina firaxan ji pisiya heram |
| **tehisandin** | şemitandin, terişandin, me sabun li bin lingê wî girêda û tehisand. |
| **tehisîn** | şemitîn, terrişîn, reş tehsîn |
| **tehisek** | cihê ku mirov jê diterişe û tê de çûn dijwar e. Filan der tebîsek e ez lê şemitîm. |
| **tehl** | tal, tama wî tehl, ne şêrîn |
| **tehlesêv** | celebek sêvên tehl e |
| **tehlik** | gindorê ku hîn şîrîn ne bûye, tehl e, rengetehl |
| **tehlîşik** | tengetehl, nîv tehl |
| **tehn** | gotinên hişk û sar, an gotinên ku pê sergerm bibe li yekî xînî. Wî tehm li min da. |
| **tej** | raxera yekber ku ji rîs çê dikin |
| **tejî** | tijî, ne vala |
| **tek** | fer, nezo yek, tek bi tek fer bi fer |
| **tekelek** | tekerê ereban, an otombêlan |
| **tekûz** | nekêm, temam, her tiştê wî tekûz e. |
| **tekve** | cihê ku şêx û sofî ji xwe re dikin şarge |
| **telaş** | bê tewatî, xwe şaş kirin, ket telaşê, bi talaş hat, telaş: perçek dar telîş an depê ku ji kok radibe, telîş |
| **telaştin** | darek an depek kirîn du an çend telaşan |
| **telef** | alas, bê fêde, tinne, Wî ev cil telef kirin. |
| **telifandin** | telef kirin, xira kirin |
| **telifîn** | telef bûn, telifî mir |

| | |
|---|---|
| **telik** | kumê ku didin serê xwe |
| **telîs** | kîs, çiwal |
| **telp** | tort, ji ber kelê tiştê ku dadikeve binê firaqê, telpa qehwê, telpa şîrê |
| **temam** | tekûz, ne kêm, min karê xwe temam kir. |
| **temaşa** | lê nihêrîn û lê hûr bûn. Em çûn temaşa sînemayê. |
| **temar** | reh, te bi temara mirinê girt. |
| **temartin** | binax kirin, min erd ew temirand. |
| **tembekî** | tiştekî wek totinê ye bi nerqîlê dikêşin |
| **temerî** | temberî,temlî,ew celeb kurkirina serî ku tenê di paş ve por dihêlin, xortê bi temerî |
| **temzî** | temerî, celebek destmalên ebrîsimîn jin di ser kofiyan re girê didin |
| **temirandin** | temartin, bin ax kirin |
| **temirîn** | bin ax bûn, ew çîrok temirî û çû, |
| **temisandin** | serpor kirin, bincil kirin |
| **temisîn** | bincil bûn, xuya nebûn. filan bi carekê temirî nema xuya dike. |
| **temtîl** | tentel, tertîb, dûzan. temtêla vî tiştî tu bidê. |
| **tenahî** | yekîtî, di nav wan de tenahî heye. |
| **tenbîh** | qewîtî. min ew tenbîh kir. |
| **tenbû** | |
| **tenbûr** | celebek sar |
| **tenbûrvan** | kesê ku tenbûrê baş lê dide |
| **tendûr** | ji axê çê dikin û tê de nên dikin, nanê tendûrê |
| **tendûrek** | kewijîn, helkîn |
| **teneşek** | depê ku cendekê miriyan li ser dişon |
| **teng** | ne fireh. ev rê gelekî teng e. teng dûs, tal, semt em di wê tengê re li çem raperîn. |
| **tengal** | kelek, newq, min darek li tengala wî da, tengal. yar, heval, hogir, ma tu tengalê wî yî? |
| **tengav** | di çeman de cihê ku kur û teng dibe |
| **tengijîn** | ji tiştekî kîz bû n û bê saman jê vekişîn |
| **tenha** | cihê ku kes tê nebe, ev der tenebîtir e. |

| | |
|---|---|
| **tenik** | ne sitûr û qalin, nanê tenik, lêva tenik |
| **tenikayî** | tenik bûn |
| **tenişder** | |
| **tenişt** | rex, kêlek, tihêl, were li tenişta min rûne.. |
| **teniştkî** | li ser teniştê di kêle kê ve. |
| **tenî** | qirêja reş ku ji dûyê daran digehê hev, teniya binê biresê, teniya rojinê, teniya sêlê |
| **tep** | hîle, xap, filan mirovekî bi tep e.tep lep, firehiya her pênc tiliyan. wi' tepek li serê min da |
| **tepan** | ji pistîk, dirî çêdikin û pê axa bîstanan bi di ser re rakişandinê rast dikin. me bîstsnê xwe tepan kir. |
| **teprik** | sergînê ku texin devê kuna mêşhingivê |
| **tepereşk** | sergînê nebaş û pir dû dike |
| **tepetep** | peyda kirin, xwestin |
| **tepetor** | dema çend kes bi hev re li yekî didin dengê ku ji lêdana wan tê. me tepetarek da wî me jê re tepetarek baş çêkir. |
| **tepik** | sergînê ku ji rêx û kayê çêdikin |
| **teplik** | |
| **tepisandin** | bincilkirin, veşartina tiştekî ku nexwazî kes bibîne. min ew çîrok tepisand. |
| **tepisîn** | hatin, vesirîn, bincil bûn |
| **tepişandin** | dev û lêvên yekî werimandin, min ew tepişand. |
| **tepişîn** | dev û lêv jê werimîn. devê min tepisî. |
| **tepor** | teb or, bêjingê mezin, nîv serad |
| **teprep** | dengê ku ji lingan tê |
| **tepreş** | hîlebaz, xapînok |
| **teptep** | dengê ku ji dil tê. di lê min dikiye teptep. |
| **teqalik** | |
| **teqan** | teqiyan, teqîn, dengê tifingê dengê ku ji darekî têt, teqîne tifingê, teqan jê hat |
| **teqandin** | deng pê xistin, wî tifing teqand. |
| **teqil** | giranî, filan tiştî bi teqil e. |

| | |
|---|---|
| **teqilandin** | bi destan rakirin û giraniya tiştekî seh kirin |
| **teqilîn** | hatin teqilandin |
| **teqîn** | erdê silav ku mirov pê de diçe xwehr. nava gelek sazlixan teqin e. |
| **teqinîn** | ketin teqinê, lingê mirov bi çarenûsê de çûn |
| **teqteqok** | ew tiştê ku zarok diteqînin |
| **ter** | firo, dema pezan çêlek dizên şîrê her sê rojên pêşîn |
| **terr** | ne hişk, da rê terr û hişk, taze nuh |
| **terra** | hîn terr, nû terr. ew dar terra ye. |
| **teraf** | birîna tiloyên darê ku bi dor de tên |
| **terraf** | xweliya ku xisar ango bizot tê de hene. terraf di erqûr. de heye. |
| **terafkirin** | terifan di n. tiloyên darê ên zêde û bê kêr birrtn |
| **terrahî** | mcyweyê ku dimîne zivistanê |
| **terrane** | |
| **teraştin** | şerhe kirin, vî goştî biterisîne. terraş terraş kirin |
| **terazîn** | di navçava çiyan de cihê ku rast û hêşinahî hebe |
| **terciman** | werger, kesê ku gotinan ji zimanekî werdigerîne zimanekî din |
| **terrdîn** | nîvdîn, beredayî, kesê ku pêşî û paşiya xwe nenase |
| **terredinî** | terredîn bûn, xwe dînok ravekirin |
| **teref** | alî, hêl. li vê terefê çû terefa din. |
| **terremer** | xweşcamêr, delal, hêja |
| **terremerî** | terremêr bûn, xweş camêr bûn |
| **teres** | pîs, çav pehn |
| **teresî** | pîsî an çavpehnî kirin |
| **terez** | qaq, qeşa, bûz. erdê terez girtiye. |
| **terfende** | terwende, nûh, taze. ev fêkî terfende ye. |
| **terfik** | |
| **terhî** | Kitan, çarika ku jin didin sere xwe |
| **terifandin** | teraf kirin, tila û pijên darekê ên zêde birîn, malê yekê ê jê zêde jê sitandin |
| **terifîn** | hatin terifandin. îsal ez terifîm yanê ji malê zêde bêpar bûm. |
| **terrik** | êzingê terr, kîr. terri kê wî, kîrê wî, çend terikan têxe agir, çend êzingên terr |

| | |
|---|---|
| **terikandin** | dev jê berdan, hiştin, terk kirin |
| **terikîn** | terk lê ketin. ev dîwar terikiye. |
| **teriqandin** | ji cih û war an ref êxlî bi dûr xistin. te ew teriqand, wî hêş tir teriqandin. |
| **teriqîn** | ji cihê xwe bi dûr ketin, hatin teriqandin. ez ji ber zînata axê teriqîm û ji cihê xwe bi dûr ketim. |
| **terişandin** | lingê yekî li bin kirin û xisti n, wî ez terişandim. |
| **terişîn** | li bin bûn û ketin. erd şil bû, ez jê terişîm. |
| **terrî** | dûv, boç terriya ga an hêstirê. |
| **terrî** | kesê ku xwe bê raman dispêre xelkê. ew bûye terriya filankes. |
| **terrîş** | di çiyan de cihên ku terkên mezin lê dikeve û hinek jî tête xwehr yê mayî dibe terrîş |
| **terrîşek** | kaşên ku av lê siwar dibe û tê de rêveçûn dijwar dibe |
| **terk** | qelîşên gelek sivik ku ji hev bi dûr nekeve. ev depî bi terk e. |
| **terk** | ji terkandinê, min ew terk kir, berdan |
| **terlan** | navê padîşahê teyran, di efsaneyên kurdan de tê gotin, xortê gelek çeleng. ev law terienekî xortan e. |
| **term** | kabûs, giranî û tiştên ku di xewê de ji mirov re sê dibe û bêhna mirov diçikîne. îşev term haf ser min. |
| **termal** | |
| **terpilîn** | tevgereke ji pizivînê xurtir, min lê da qet neterpili. |
| **terş** | tewa, tiştekî xuyîca n ku nizanî çi ye. bi şev ez diçûm min terşek dît dema nîzîkê bûm min dît ku hêstir e. |
| **tersê şevê** | ew tewayê ku bi şev li hinek mirov di şeklê her tiştî de dikare xuya be |
| **tert** | kesên axê ku tevî giya li ber gîsin ru dibin û dihev de nakevin |
| **terteg** | di axuran û goman de ziblê hişk dema tête şikandin, her perçek tertegeke. |
| **tertûl** | tirtul, kurmekî bi pirçe li hin daran dikeve |
| **tertûr** | |
| **terxûn** | giya ke bi xwarinê re xag tête xwarin |
| **terz** | awa, bi vi terzî ez nikarim çêkim. |
| **terzî** | kesê ku cilan didirû, terzî cilên min dirûtin. |

| | |
|---|---|
| **tes** | |
| **teşî** | noqteşî, d oxtesî, ew darê ku pê ebirşim. hirî û pembo dirêsin |
| **teşilok** | teşiya biçûk |
| **teşk** | eşk,teyşik. isk, reha ku ji paqê dadikeve civoke. pez bi teşkê tête darve kirin. |
| **teşt** | firaxa mezin ku tê de cilan dişon |
| **teşxele** | tejxele, rê li ber şaş kirin. filan teşxele li me dike |
| **tet** | bi zarê zarokan, dest |
| **teter** | hilmiştî, ramiştî, sivik, filankes teterekî mêran e. |
| **tetik** | lepik ji tet tê, lê ji lepikên zarokan re tête gotin |
| **tev** | bi hev re tev hati n, tev çûn |
| **tevahî** | hemî, gişk. tevahiya wan sed mêr in. ew bi tevahî hatin. |
| **tevaz** | tevazok, ji ber hin haletan xwarin wek pirzikan ji laşa mirov bi dertê |
| **tevdan** | li hev xistin, gellacî girin, wê xwarin tevda. ew li tevdanê hez dike, xwe tevdan, hindikekî dest birina xwe |
| **tevde** | hemî, giştik, ew tev de hatin. |
| **tever** | hacetekî wek tevir lê biçûk ê pê giyayên nebaş di nav pembo û bîstanan de dikolin |
| **tevger** | awayê kir û livê ji tevgera wî min zanî ku ne jîr e. neqenciya wî ji tevgera wî xweya ye. |
| **tevgeriyan** | tevgerîn, di xwe xurcilîn, xwestina kirina tiştekî, ev tevgerina wan ne vala ye. |
| **tevir** | hacetê ku pê axê dikolin |
| **tevirik** | ji tever biçûktir pê nava gul û sadîlan vedixwînin |
| | |
| **tevizandin** | bê tevger kirin, lêdan an kirek welê ku hemberê xwe bê tevger hiştin, min bi vê yekê ew tevizand. |
| **tevizîn** | ji bê tevgerî qerimîna lebatekî ku derzî dike lingê min tevizî. |
| **tevlîhev** | tevîhev, du an çend celeb tişt an gotin xistin nav hev. şalê filanê tevliheve. gotinên wî tevlîhev in. |
| **tevlîhev** | xwarinek ji niskan û savarê çê dikin |

| | |
|---|---|
| **tevlok** | kesê ku ji kir û gotinên wî re rêzanek nîne û tevlîhev dike |
| **tevn** | dezgehê ku pê tej, xalîçe û raxeran çê dikin. hacetên tevna kurmancî ev in 1. sêpî, sexrnê, 2. belş, 3. seranek, 4. pij, 5. hepo, hevo, kirkît, 6. masûr, 7. piparik, 8. firêt, 9. gur |
| **tevnepîr** | konê pîrê, tebetûr dawa pindir, daba pindirê |
| **tevo** | dûmana ku ji ber bagerê berfê bi lind dibe. ji ber bagerê teva digehê ezmanan. |
| **tevşo** | hacetê ku necar pê depan çê dikin û têxin şiklekî |
| **tevz** | ji tevizinê |
| **tew** | tewr. qet. min ev der tew nedî, te tew nediyeş ez tew neçûme wî bejerî. |
| **tewa** | tişt. ev çi tewa yeş ev ne tu tewa ye. |
| **tewandin** | xwehr kirin. qat kirin. pêçan. ev dar baş nehatiye tewandin. tewandina ben, xwe tewandin |
| **tewîn** | xwehr bûn. ew xwe ditewîne. ez te wiya m, bitewe. |
| **tewaş** | rûn. nivîşk. dom. bez. qelî. îsal em bê tewaş in. |
| **tewbe** | ji kirekê poşman bûn û nekirina wê dan berçavên xwe |
| **tewek** | qat, me du tewek ax kola tewek bi tewek rake. |
| **tewirandin** | dem jê derbaskirin, me xew jê te wira nd. |
| **tewirîn** | dem jê derbasbûn. xwîn ji min tewirî, yanê dema berdana xwînê ji min çû. |
| **tewl** | cihê ku hespan tê da girê didin û bi cih dikin |
| **tewlandin** | girêdana hesp an dewarekê di nav çayir an çîmenekî de |
| **tewitîn** | di cîkî de hatin g irêdan û bi cih bûn. hespê min di vir de tewiliye. |
| **tewş** | boş. vala. beredayî, bêfêde |
| **tewşomewşo** | kesê ku di her kar û xebatên xwe de tewş be |
| **tewtewe** | kesê ku bi zimên dixwaze kêmiyên xwe veşêre û ji hêjabûna xwe pirtir ji xwe re cihekî pêk bîne. şarlatan |
| **tewz** | kuşeti, henek. qerf. filan gelekî tewzan dike. ma tu tewzên xwe bi min dikî? |
| **tewzirandin** | tiştek di dilê xwe re derbas kirin û jê bi şibhe nayin. te ew tişt di dilê xwe de tewzirand, ji wê yekê re tewzirandin navê. |
| **tewzirîn** | ji dil derbas bûn. jê şibhe bûn. ew yek di dilê min de tewzirî. |
| **tewzok** | kesê ku tewz û henekan pir dike |

| | |
|---|---|
| **tewzonek** | kesê ku xwe dike tewz û henek û xelk tewzên xwe pê dike |
| **tex** | bi şûnde veger. min gayên xwe tex kirin. |
| **texdeme** | |
| **texlît** | celeb. çeşit, tîraz. awa. ew qelem çi texiît e. te çend texii kitêb heneş |
| **texmîn** | guman. texmîna wî ne rast e. ez bi texmîn çûm. |
| **texnik** | |
| **texsîr** | Texsîrî.kêmasî bi şûn de mayîn. Me derheqê w de texsîr kir, çi texsîriya me heye bide ber çavên me. |
| **text** | dep. me li ser banê xwe mezelek ji textan çê kir. |
| **texterewan** | wek sendoqan ji bo rûniştina mirovekî an didoyan çê dibûn û çar peyan li ser milên xwe radikirin |
| **texer** | ji bo avdana pez û dewar an êm kirinê kok daran a hundir vala li ser dirêjiyê diqelêşin û dibe du texeran |
| **teyirandin** | bi zor an lêdanê lebatekî kes an dewarekê dan girtin. yanê ji tevger xistin |
| **teyirîn** | ji tevger ketina lebatekî. pişta min teyirî, lingê min tevirî. ev serma laşa mirov diteyisîne. |
| **teyisandin** | biriqandin. çirisandin. cîla kirin û biriqandin. ji bo teyisandina vî dîwerî gelek boyax divê. |
| **teyisîn** | biriqîn. çirisîn. tûtya serbanê me li ber royê diteyise. |
| **teyrok** | zîpik, terez. xisxisok, qeşa hişk û girover ku di ezmên de dibare. silsilik. xilolik |
| **tezandin** | |
| **tezene** | darik. an tiştê ku pê tenbûr û odê lê didin. tezenê tenbûrê |
| **tezî** | dema yek laşd xwe giran dibîne rehên xwe radikişîne. ew teziyan dikêşe. |
| **tê** | hatina tiştekî şanî dide. têye, ew tê. |
| **têcir** | tacir. kesê ku bi kirîn û firotina tiştan mijul dibe, çiwal tê diçe. |
| **têçûn** | kunbûna firaxekê ku tiştê tê de biriye. misîn tê diçe |
| **têdadan** | bi lez û bez rahiştin û revandin |
| **têdan** | biha dan xuya kirin. min 10 qemerî têdan neda. têgerandin. min derman têda lê birîna min xweş nebû. |

| | |
|---|---|
| **têdan** | tê dayîn. tê gerandin. min merhem di birîna wî da. wî bela xwe di min da. |
| **têdakirin** | êxistina tiştekî di nav tiştekî ron. min ev cil di boyaxê de kir. min ev kiras avê de kir. me meşlûl di pelokê de kir. |
| **têdeçûn** | qîma xwe bi kirekê anîn. ew di vî karî neçû. ez tê diçim. |
| **têderanîn** | têderêxistin. min têderanî, têderanîna vê yekê gengaz e. |
| **têderxistin** | têderanîn. naskirin. zanîna tiştekî. min di a dilê wî derêxist. têderêxistina vî tiştî ne hêsanî ye. |
| **têgehiştin** | fehm kirin. ez têgehiştim. ew têgehiştî ye. |
| **têhatin** | tê de derketin. ev bêje ji bo nifiran tête gotin. tê de hato yanê nexweşî ji laşê derketo di kezeba te de hatî. |
| **têhilanîn** | di nav de rakirin û derxistin. di nava koma dijmin de min tê hilanî û bazda. |
| **têhildan** | kêmiyên yekî bi derxistin, xeber li ser yekî dan, guhbelav di min hildan, yanê li ser min îxbardan. |
| **têhilatin** | di nişk ve lê derketin, an raberizîn, wî hew dit ku em tê hilatin. |
| **têje** | çêlikên sehan, guran û maran ên yeksale û berjêr |
| **têjik** | çêjik, çêlikên dehbeyên dirinde, têjikên hirçê |
| **têk** | tik, meqbûl, têk e ne têk eş |
| **têk** | digel, têk hatin, têk çûn |
| **têkdan** | tevîhef kirin, li hevxistin. min nîsk û savar têk dan. |
| **têketin** | daketin, ketina nav daketina nav. têketina wî ya avê qelekî bi hosteyî bû. |
| **têkirin** | qebûl kirin, hesibandin, vê kira wî tê meke. |
| **têkil** | têkilî. dastdan, tê xeberdan, têkilî vî tiştî nebe. te bi têkilbûna xwe ev tişt xira kir. |
| **tekilhev** | tevîhev, tevî hev. lihevre, me zadê xwe tekilhevkir, ez û wî tekilhev çûn. |
| **têr** | ne birçî, min têr xwar ez têr bûm, çavtêr. ne tîna, |
| **ji xwe têr** | ji xwe barîn. ji xwe razî |
| **têrr** | heqîba mezin têrra qewerdan girs dibe |
| **têbihurîn** | têborîn, efû kirin, ez di gunehê wî bihurîm. têbihurîn. karê camêran e. |

| | |
|---|---|
| **têrabûn** | bê hemd ketina karekî an kirekê, bê dilê xwe em di vî keri an kirê re bûn. |
| **têrakirin** | tê re derbas kirin, min ta di derziyê re kir. vî tayî tê re ke. |
| **têrav** | ava wî têr têr av dayî, ew erd têrav e, ev meywe têrave. |
| **têrken** | kesê ku pir dikene û dikenîne . |
| **têtik** | firaxa binî şikestî |
| **têwerbûn** | di cihekî de ketin an nediyar bûn, ew di ser xanî wer bû. |
| **têwerdan** | lê pêçan, nava firaxeke bi têxistina avê û çelqandinê paqij kirin. vî cawî di laşa wî werde. avê di firaxê werde. |
| **têwerhatin** | lêwerdan, dara tiştekî girtin û şemt kirin |
| **têwerkirin** | tê de avêtin, min ew di banî werkir. |
| **têxistin** | êxistina nav tiştekî. zad têxe kîs. |
| **têz** | qasa barûtê ku têxistin faliya tifingên kurmancî, piçek têza barûtê têzek xoy têzek şekir |
| **tezîn** | |
| **tibare** | di her tiştî de hêla bilindtir |
| **tif** | tûk, xazî, filan her tif erdê dike. |
| **tifaf** | hinek, qasek, riya me tifafek maye, gund tifafekî dûr e. |
| **tifaq** | li ser kir an tiştekî gotina çend mirovan bûn. yek me ji bo vê yekê tifaq kir. |
| **tifing** | ew çeka ku bi hikmê barûtê tête teqandin |
| **tifik** | argûn, cihê ku tê de agir dibe |
| **tifok** | kesê ku pir tif fike. filan gelekî tifok e. |
| **tifiqîn** | li ser gotin an kirekê bûn yek |
| **tihn** | hewceyî vexwarina avê. tî, ez tihnim. |
| **tihnav** | |
| **tihntavik** | |
| **tihnoşik** | tihnojik |
| **tihnoyî** | |
| **tiktikandin** | nikul kirin, teyr darê ditiktikîne |
| **tilar** | terral, tenbel, ew tilarek e, an teralek e. |
| **tilarî** | tiralî, tilar bûn, terral bûn |

| | |
|---|---|
| **tilih** | tilî, her pênc tiliyên dest tiliha qişşê, beranek, girdek, şehde, dalastok, navînê, navçar, berqelîçkê. babilîçik, qereqûçkê, qelîçik |
| **tilik** | dane, heb, lib, tilika tirî |
| **tilîlandin** | zilxit kirin. tilîlî gotin. şayî bû jinan serekî dirêj tilîland. |
| **tilîlî** | zilxit. wan em dan ber tilîliyan |
| **tilol** | |
| **tilolok** | |
| **tilorî** | |
| **tilp** | |
| **tilt** | perçek ji herçar perçên berê aş. |
| **tilt** | sêyek, yek ji sisêyan |
| **tim** | hergav, hercar, ez tim wî li vir dibînim. |
| **tima** | keskê ku çavê wî li malê xelkê çikos |
| **timakar** | kesê karê wî ber timayî be |
| **timakarî** | timakarbûn |
| **timam** | nekêm, tikûz, wî karê xwe timam kir. |
| **timamî** | nekêm, mayî, tikûzî |
| **timatimim** | her car her car |
| **timtêl** | kesm, xuya kirina bejna wî. timtêla wî li xweşiya min nayê. |
| **tinawir** | rawir xweyîcan |
| **tinaz** | henek, kuşetî, filan tinazan dike, ma tinazan bi min dikî ? |
| **tinazkar** | kesê ku tinazan pir dike |
| **tincik** | şehfik, porê pêş eniyê ku bi ser çavan de tê |
| **tind** | hişk, xurt, zehe |
| **tine** | nîne, tiştekî min tine, gunehê wî tine. |
| **tinebûn** | nebûn, hebûn tinebûna wî wek hev in. |
| **tineyî** | bê kêrî, bê malî |
| **tinê** | bê heval û hogir, ew bi tinê hat. |
| **tinêtî** | bi tinê bûn, tinêtî ji xwedê re ye. |
| **ting** | |
| **tip** | dengê sivik |
| **tipên** | dengê lêdaneke sivik, min ji tipêna te tu nesî. |

| | |
|---|---|
| **tipilk** | findoq, pil |
| **tirr** | bayê ku li ber mirov diçe û deng jê tê |
| **tirad** | bi siwarî di qadê de hesp bezandin. ew bi min re ketiye tiradê. |
| **tiral** | tilar, kesê çavpehn ku ji xebatê hejmareke û mêldarê rûniştinê ye. filan peyakî tiral e. |
| **tirandin** | tir jê dan der, me ew tirand. |
| **tirar** | tas. qedeh |
| **tiraso** | |
| **tiraştin** | kolana tiştekî di rû ve, tiraştina kevir |
| **tirb** | gor, tirba kuştiyan |
| **tirbêt** | hogir, aşîna, filan tirbêtê min e. |
| **tirbûs** | terbîs, telbîs, terrbûna axê, dema payizê baran dibare û digehê şilahiya bin erdê. baran ket tirbûs bi erdê de çû. baran berî tirbûs ket, baran barî tirbûs gîha hev. |
| **tirçimaq** | |
| **tirrek** | kesê pir tiran dike, kesê ji xwe zêde dike an dipeyive |
| **tirrekî** | ji xwe zêde gotin an kirin, tirrekiya filanê nayê kişandin. |
| **tirih** | tirî |
| **tirh** | tûrî, şivên ku ji koka mewa rezan dertên û ji bo xurtbûna kokê tên jêkirin |
| **tirhik** | tirha biçûk ku ji koka mêwan çêdibe |
| **tirihan** | av pengîhî û di ser re tiriha. |
| **tirrik** | tûtirk |
| **tirk** | gelê tirk |
| **tirkanî** | wek tirkan, mîna tirkan |
| **tirrkewîn** | kesê ku ji kurikan hez dike, lûtî |
| **tirole** | dewê tûr, wek xwarina tirolê bê tam e. |
| **tirlî** | tirlû navê teyrekî |
| **tirme** | şaşika axibanî, heciyên bayaran bi tirme ne. |
| **tirrone** | mirovê serserî, derbeder û bê armanc ku xwe dibîne |
| **tirozî** | encûr, xitik |
| **tirs** | qelsiya ku ji dil çar dibe. bê tirs ez çûmê. |

| | |
|---|---|
| **tirsandin** | tirs dan yekî, me ew tirsand. |
| **tirsîn** | tirsan, tirsiyan tirs gîhana yekî, bi şev em tirsîn, ji tirsan qutifî hev, ew tirsiya. |
| **tirsok** | tirsonek, kesê ku pir ditirse |
| **tirş** | tama wek hinar leymun û simaqê |
| **tirşik** | xwarina ku ji keskayiyên tirş çêdikin, tirşiya şamikan, tirşiya bihîvan |
| **tirşok** | tirşong, celebek giyayî tirşe bi xavî tê xwarin |
| **tirtire** | an bi geda xwe an bi dilê xwe mezin. filan tirtirekî mêran e. |
| **tirtîk** | mûyê celebek bizinên gewr bi vî navî ku jê gelek tişt, nemaze şal û şapikên baş çê dibin |
| **tirxan** | efû, hikumetê tirxan da, filanê tirxana xwe xwest, min ew tirxan kir. |
| **tirxik** | şirtik, xiltê ku biharê li serê şirê mewan dertê û renge miz e |
| **tisî** | bê pêxwarin, nanê tisî bixwe. |
| **tişt** | teba, ew çi tişt e? tişt nîne. |
| **tlştîr** | bizina ku di salê temam dike û dikeve sê salê |
| **titûn** | giyayê ku ji belkên wê cigare tên çêkirin |
| **tivanc** | yajan, eşa ku ji ber lêdan, ketin an nexweşîkê digehê dil, tivancê xwe da dilê min. |
| **tivir** | tisp, bi xwarinê re xag an tirşo tête xwarin |
| **tivîk** | |
| **tivlik** | teyrek e, ereb jê re tirxil dibêjin |
| **tiwandin** | karîn, şiyan |
| **tiwanîn** | karîn, şiyan |
| **tixarîs** | pêşiya xiftan an kiras |
| **tiximîn** | |
| **tixîrîk** | |
| **tixm** | |
| **tixt** | |
| **tixtixandin** | kirkirandin, qidqidî kirin |
| **tixtixîn** | kirkirîn, qidqidî bûn, min ew tixtixandin. |
| **tixûb** | sînor, tixûbê gundê me digehê ber çem. |

| | |
|---|---|
| **tixumîn** | jê çûn, made kirin, ez ji vê xwarinê tixumîm e. |
| **tixa** | |
| **tizbih** | tizbî, 99 hebên ku bi ben ve dikin û pê nimêj dikin. tayê tizbiha min qetî. |
| **tî** | birayê mêr. |
| **tî** | hewceyî avê, ez tî bûm. |
| **tîj** | tûj, ne ko, kêra min tîj e. |
| **tîjik** | tîşik, tîşên di xuftanê mêr û jinan de |
| **tîjva** | derewîn, filan tîjvakî ecêb e. |
| **tîk** | kaşê tuj û rast, min berî da serê çiyê û tîk çûn. |
| **tîmarî** | erdê gengê ku hinek bi ajotinê dest datînin ser, bê tapo |
| **tîmr** | xurandin û mistdan, tîmara hespê, min hesp tîmar kir. |
| **tînoşkî** | ji tîna ziwa bûyî. ev erd tîroşkî bûye, ev bîstan tîrşokî bûye. |
| **tîp** | birek siwar, |
| **sertîp** | qumandanê tîp |
| **tîr** | tîra ku bi kuvan tête avêtin. tîra ku pê nên fireh dikin. |
| **tîr** | ne ron, mastê ne tîr bû |
| **tîraje** | kesk û sor |
| **tîrêj** | tîrêj, tirij, şewla royê ku di penceran re dikeve mezelê an cihekî |
| **tîrmar** | celebek marê zirav û bi jehr |
| **tîrtîrik** | kurmê reşê ku di meha tebaxê de deng jê tê |
| **tîş** | qelîşên ku li çil û kincan, an depan çê dibin tîsa kiras, tîşa dep |
| **tît** | ji bo qewitandina se û pisîkan tête gotin, |
| **tît** | mêrat |
| **tîtalek** | navçava darê, cihê ku bê teyr tiştek nagehê |
| **to** | roşîr, romast, tayê ser rûyê şîr an mast |
| **tobe** | berdan û vekirina kireke an gunekî. Min kirina vî tiştî tobe kiriye. |
| **tod** | wek sendeqan dar bi perdan girtî datînin ser pişta hêstir û hêstiran û jin tê de rûdinin |
| **tof** | taqim, sinif |
| **tofan** | ava pir, ku lehî tên û erdine fireh didin ber xwe û xerab dikin |
| **tog** | seyê bi cisim û pîsik û nekêrhatî |

| | |
|---|---|
| **tok** | hesinê bi pîjik ku têxin stuyê sehan |
| **tol** | jina ku ji namûsa xwe re qels be û xwe bi dev her kesî ve berde |
| **tolaz** | peyayê ku her li pê jinan digere, zendost, ji kesên serserî û derbeder re jî tê gotin |
| **tolik** | celebek pincare li dor malan û xirban de dibe û tête xwarin |
| **toltajî** | tajiyê ku ji bav û dê alîkî wî re be |
| **tomanî** | |
| **top** | sileha mezin ku pê gulle tên avêtin, me dijmin da ber gulleyên topan. |
| **topan** | barana ku gelekî şên û xurt dibare. Di mal de çapan e, li der ve topan e. |
| **topisk** | xilikên ku di nav tiliyan de tên avêtin |
| **toq** | xwarina têr rûn, taştiya me toq bû. |
| **tor** | ji bo neçlrê, ya kewan ji çav û ya teyran û masiyan ji caw çê dibe |
| **toranî** | |
| **toraq** | çolik, ji dewê qetandî çê dikin, ji bo zivistanê têxin postan |
| **tore** | terbiye, exlaq, filan bi tore ye, lê birê wî bê tore ye. |
| **torim** | çêlikê hêstiran ji yek salê biçûktir |
| **torin** | xwedî kok, ji tov rind hatiye. torinê hesenan mêrxas in. |
| **torinza** | kurrê torinan, kesê ku di bav û kalan de torin be |
| **torî** | çeqel, heywaneke di newalan de dijî û bi şevan bi hev re qîr dikin |
| **tortor** | gera bê armanc û raman, filan torior digere. |
| **tortore** | kesê ku bê raman û armanc bigere |
| **tot** | kundê ser xirtan, bêyom |
| **totik** | seri hêla paşin ku mêjû tê de ye. Filan totikî vala ye. |
| **totilme** | nexweşiyek ku zû mirov dikije. totilme pêketo |
| **totirne** | |
| **tov** | bizir, taxim, ê ku tête çandin |
| **tovçînî** | zadê ku ji bo tov didin alîkî. Me tovçîniyê xwe xist enbarê. |
| **tovî** | |

| | |
|---|---|
| **toz** | dûman û xubara ku ji axê radibe, hinek ji çi tiştê hur kirî; tozek ard, tozek xwê, tozek derman |
| **tû** | meyweke jê mat û şêranî ji şê dibe; tûtirk, rûreş, remtûtik |
| **tûj** | wek tama îsot û pîvazê, tiştê ku xwarina wî dev û bêhn kirina wî bêvilê bişewitîne. Tiştê ku serê wî zirav an devê wî tenik, kêra min tûj e, serê vê xiştê tûj e. |
| **tûjik** | serê gir çiya û kevirên ku zirav, serê vî giri tûjik e. |
| **tûk** | tifa ki ji devê mirov bi dertê, kêmesî ev tişt bi tûk e. |
| **tûle** | tîlkî,weşîna pûrta dehbe û teyran,ji seyên pîsik û pir cazkî re jî tête goti n |
| **tûlî** | celebek hêstirên ku pûrta wan dirêj û di welatên bi ser ma de bi xwedî dibin |
| **tûm** | her tiştê ku komik be, girê biçûk qûça biçûk koma axê ku mişk ji erdê dertêxe, tayên giya ku di ber hev de radibin, tûmê gewrîgê, tûmê birr |
| **tûman** | celebek diravê êranî |
| **tûnc** | celebek maden |
| **tûncik** | aletekî aşane ji tunc çê dibe û berê êş yê ser li ser wî digere |
| **tûr** | kîsê biçû k ku tiştan têxine |
| **tûreş** | celebek tû, rengê wan reş e |
| **tûrik** | tûrê biçûk |
| **tûrgan** | destsivik îş guzar, filan peyakî tûrgan e. |
| **tûtak** | teyreke bi şevê dixwîne, ji kesên bextereş re jî tête gotin |
| **tûtik** | ji qamîş an darê kundir çê dibe û deng jê tê ji mey biçûktir e. |
| **tûtik** | celebek xwarine bi mot çê dibe |
| **tûvil** | qaşikê pir tenik, tûvilê mar, tuvilê erîgan |

# U

| | |
|---|---|
| **u** | tîpek ji hersê tîpên bi deng ên kurt ji elifbêya kurdî, u, e, i. |
| **ucik** | bela, kesê ku mirov bi dîtina wî ne kêfxweş e, giranê, filan bûye ucik û ketiye ser dilê min. |
| **285** | |
| **û** | |
| **û** | tîpek ji her pênc tipên bi deng ên dirêj a, o, û, ê î. |
| **ûçik** | qilçik, lewendî, perçê zêde ku bi devê millê kirasan ve dikirin ku dirêjahî metrek an zêdetir bû. |
| **ûd** | qedir, minet, xatir, filan ûda dostan dikêşe, wî ûda me girt. |
| **ûde** | bi ûd, kesê bi naz û xati r û kibar. filanê jineke ûde ye her kes qedra wê zane. |
| **ûn** | tirsa ku ji wehmê digehê mirov. filanê ûn lêket ango bi wehmê tirs gîhaştê. |
| **ûpûp** | teyrê silêman ê du nikut. |
| **ûr** | hûr, cihê ku di şik de xwarin dikeve, ûr û pirtik, ûrê pez, ûrê ga |
| **286** | |
| **ûre** | sapê zad ê ku bi qelmê tête gerandin û tê bakirine. bêndera min ûre ye. |
| **ûrik** | pirtik, çelqatik ûrê biçuk. |
| **ûrîn** | dengê ku ji ga û çêlekan tê. |
| **ûrt** | erdê ber malan. îsal zadê ûrtan baş e. |
| **ûrt** | kak, temel esas, hîm. ûrtê wî bela be. |
| **ûzer** | ji çavan xweş hatin. bi van cilan tu hatî ûzerê. |
| **ûzeûz** | kûzekûz, dema li se dixin dengê ku jê tê. |

# V

| | |
|---|---|
| **v** | tîpek ji tîpên elifbêya kurdî ên bê deng |
| **va** | ev kes an tiştê mêr ê li ber çavan. va hespa hat, va kurra çû. |
| **vac** | mentiq, filan mirovekî bê vac e. |
| **vaja** | vaca, vajû, ters. Wî cellen xwe vaca wergirtine. vaca bûn, vaca kirin, vaca gotin |
| **vala** | ne tiştek tê de. ev firax vala ye, kûrika wî vala bû. |
| **valahî** | vala bûna tiştekî vala hiştin, vala man |
| **van** | ev kes an tiştên li ber çavan, tevayiya va, van hespan, van kuran |
| **vana** | ji van kes an tiştên ber çav ên ku tên ravekirin, vana got, vana kir |
| **vanî** | van sifeteke ku hate ser çi navî, aşvanî, aşvan, karivanî, karîvan, rezvanî, rezvan, şervanî, şervan, şivan, gavan |
| **varik** | şigan, mirîşka ji yeksalê biçûktir |
| **varî** | tenê ji kesan dûr, min filankes verî kir. |
| **varpitêt** | |
| **ve** | tev, ez bi wî ve çûm, pêve girêde. |
| **veaxivin** | |
| **vebir** | hatî birîn, gotina ku nebe dudu, yek gotin. bi hayê vê tisti ve bire mequti. |
| **vebirk** | tiştê ku cihekî, tiştekî dike du cihan û ji wê veqetînê re dibe şaret, wek şareta sînoran |
| **vebûn** | vebûna girêkê, ji min vebe, jê vebû. |
| **veciniqandin** | vejiniqandin, bi tirsandinê yek ji hemdê wî derêxistin. min di nişka ve qîr kir, veciniqî. |
| **veciniqîn** | ji tirsan ji hemdê xwe derketin |
| **veçinandin** | berve hev anîndan û kêl bi kêl çêkirin, veçinandina gorê, xwe jê girtin, ew xwe ji me vediçine. |
| **veçinîn** | berve hev anîn û kêl bi kêl çêkirin veçirîna gorê, veçirîna raxerê, veçirîna wî ji me. |
| **veçirandin** | ji hev derxistin, vê heriyê veçirîne. |

| | |
|---|---|
| **veçirîn** | xwe pir xeyidandin û ya di dilê xwe de tev gotin. wî bi carekê xwe veçirand, ew xwe vediçirîne. |
| **vedan** | kolan, daçikandin, me erd veda, me feq veda, me daf vedan. pê vedan pêgirtin û gestin. mar bi wî veda. |
| **vedanîn** | dan ber hev û her wekî divê rêzkirin |
| **vedirandin** | bi qelastin dan, teqandin dan |
| **vedirîn** | vedirihan, qelişîn, teqîn, peqîn |
| **vedizandin** | ji ber veşartin dayîn, bê haya kesî tiştek an kesek ji cihekî bi dûr xistin. me ew vedişand. |
| **vedizin** | ji ber veşartin, min xwe jê vedizl. |
| **vedîtin** | tiştekî ku nehatiye nasîn, an zanîn dîtin û keşif kirin. kirîstof kolomp erdê emerika vedît. |
| **veger** | ji rêkê an ramanekê bi şûn de vegerîn |
| **vegerîn** | bi şûn de hatin, dev jê berdan, ez ji wê fikra xwe vegerîm. |
| **vegevizandin** | li erdê gêr kirin, teqle kirin. min ew di axê vegevizand. |
| **vegevizîn** | xwe li erdê û ramediyayî gêr kirin, ker di axê vedigevize. |
| **vegirtin** | rakirin, hildan vekirin, fetih. me kom vegirt, wî bajar vegirt, wê perde vegirt, xwe jê vegirtin, zû zû nîzîkê nebûn. |
| **vegotin** | gotina xwe bi şûn de nedan, îqrar kirin |
| **veguhartin** | veguhastin, vegurandin, cihê tiştekî guhartin, ji cihekî birin ciheke |
| **vegûrizandin** | bê ku lêv ji hev rabin rûyê yekî kenandin |
| **vegûrizîn** | bê ku lêv ji hev bi dûr kevin, bi çavan kenîn |
| **vehatin** | li kesekî vegerîn û stûxwarî lê kirin. dewi ez jê vehatim û min kira wî ji bîre kir |
| **vehatin** | tewîn, xwe xwehr kirin, ez vehatim, vehatina wî ne ew çend dijwar e. |
| **vehecirandin** | ji cihê wî bi dûr xistin. Me ew ji welêt vehecirand. |
| **vehecirîn** | ji cihê xwe bi dûr ketin, nizam çima ew ji gund vehecirî? |
| **vehewandin** | li tiştekî an dara kesekî civandin |
| **vehewîn** | qîma xwe bi kesekî anîn û li nik wî mayîn an li dorê civîn |
| **vehêjandin** | hejandina sivik daweşandina sivik, vî mehfûrî vebêjîne, derguşa biçûk vehêjîne. |
| **vehinirandin** | |

| | |
|---|---|
| **vehinirîn** | |
| **vejandin** | ji nû ve çêkirin |
| **vejîn** | vejiyan, ji nû ve şîn bûn, çê bûn |
| **veketin** | ramedîn,li ser kêlekê veketin,deverû veketin,veketina wî wek ya şêran e. |
| **vekêş** | tezî kêşan, vekêşan dide xwe. |
| **vekirin** | berdana tiştekî girêdayî, lêk vekirin, tê vekirin, jê vekirin, ji hev vekirin |
| **vekirî** | ne girtî, derî vekirî ye, dikan vekiriye, rê vekiriye. |
| **vekişandin** | bi şûn de kişandin, xwe vekişandin |
| **vekişîn** | vekişiyan, xwe bi şûn de dan |
| **vekişkişandin** | hêdîka rakişandin, berve xwe kêşan û bernedan |
| **vekuştin** | bê deng û hiskî kuştin, min agir vekuşt, ango ser por kir û bêhn jêçikand. |
| **vemalîn** | vemaltin, xwe hilmalan, destê xwe vemale, cilên xwe vemale. |
| **vemaliştin** | xwe hilmiştin, xwe vemaliştin, ango xwe rapêça. |
| **vemewzirîn** | tezî dan xwe, wî xwe vemewzirand. |
| **vemirandin** | tiştekî vêketî kuştin, vemirandina agir, vemirandina çirê |
| **vemirîn** | hatin kuştin tiştekî vêketî, vemirîna agir, vemirîna çirê. |
| **vemiştin** | xwe vemalan |
| **vemitandin** | |
| **vemitîn** | |
| **vemistin** | |
| **venan** | venin, daniştin, teyr li ser darê vena, venana teyr. |
| **venandin** | veniştin, venandina teyr, lêvenandin, lêxistin |
| **veniştandin** | venandina çi tiştê difire û di jor de tê erdê |
| **veniştin** | venan, veniştina teyr |
| **veperîn** | bi semt jê raperîn |
| **vepijiqandin** | pijiq, pijiq ji hev belav kirin. Herî li ber lingê hespê vepijiqî. |
| **vepijiqîn** | ji hev pengizîn û belav bûn. em ji hev vepijiqîn. |
| **vepijilîn** | ji hev pij û belav bûn |

| | |
|---|---|
| **veqelaştin** | ji hev qelaştin û perçe perçe kirin |
| **veqetandin** | ji hev qetandin û bi dûr xistin, me mî û bizin ji hev veqetandin. |
| **veqetîn** | ji hev bi dûr ketin. em ji hev veqetin. |
| **vereşandin** | tiştekî wûndindî, vekirin |
| **verisandin** | ji hev vekirin, verisandina gorê. Şêran verisand qeyd û zencîr, her sê bi tebeyi çûne nik mîr. |
| **verişandin** | dilê yekî li hev xistin û xwarina di zikê wî de dan derxistin |
| **verişîn** | verişan, xwarina di zik de bi derxistin. ez verisîm. |
| **verêkirin** | bi rê xistin, min ew verê kir û şande cem we. |
| **verêtin** | rijandin |
| **verûçikandin** | pûrtikandin, rûçikandin |
| **verotandin** | rotandina tiştekî bi tiştekî, verotandina kodê, verotandina conî, verotandina cir. vê kodê veroje |
| **verûvî** | |
| **veşartin** | li ber çavan rakirin û hilanîna tiştekî, van tiştan veşêre. |
| **veşûştin** | di rûve hêdîka şûştin |
| **veterisîn** | |
| **vevirandin** | ser pas kirin, ser vekirin |
| **vevirî** | şitiyar serpas, servekirî |
| **vevirîn** | ser pas bûn, ser vebûn |
| **vewejartin** | ji xwe re kirin adet, ji xwe re ew girtin, an bijartin. Filên vexwarina ereqê vewejartiye. |
| **veweşandin** | nerm û hêdî hejandin, li ba kirin, dawandin |
| **vewirandin** | rastî gotin, eşkere kirin, îfşa. Wî sûcê wan vewirand. |
| **vexumandin** | ji bîrve birin, ji xwe birin. me bi dermanan ew vexumand. |
| **vexumîn** | ji bîrve çûn, ji xwe çûn, dilê min vedixume. |
| **vexwarin** | tiştê ku bê cûtin diçe hundurê mirov, av vexwarin, dew vexwarin, ereq vexwann |
| **vexwendin** | dawet kirin, ezimandin, filên em vexwendine ser şîvê, |
| **vexwendî** | kesê ku tête vexwendin. Îro daweta filan kes e û ez jî yek ji vexwendiyan im. |
| **vezelandin** | razandin, ramedandin, min zarok vezelandin. |

| | |
|---|---|
| **vezelîn** | vezeliyan, razan, ramedîn, ez bêhnekê vezelîm. ez bêhneke vezeliyam. |
| **vêkdan** | tev bi hev re tiştek dan. Me dayina xwe vêkda. em her car vêk didin. |
| **vêketin** | pêketin, agir vêket. çira vêket. veketina agir |
| **vêkêxistin** | bi hev xistin, bi heve girêdan, vêkêxistina fargonan |
| **vêga** | niha, vêgavê, vêga hat |
| **vêl** | ne kûr. ev firax vêl e. |
| **velik** | vêl û biçûk |
| **vêtin** | |
| **vêvirî** | şitiyar |
| **vêxist** | pêxistin vêxistina agir çirê vêxîne. |
| **vijiqandin** | pijiqandina tiştekî ron, vijiqandina avê |
| **vijiqîn** | pijiqîna tiştekî ron, pijiqîna şîr |
| **vincik** | şîtir. şîvir. xirpal, gimcî, perçên cilên çiriyayî ku pê de li ba dibin. Cilên wî vincik vincikî bûne. |
| **vişab** | ejderha, marê pir mezin lê kurt |
| **vir** | hir, ev cih, were vir, li vir çû. |
| **vir** | derew, filan pir viran dike. |
| **virave** | ji xwe postan peyivîn, hin kes di nexweşiyê de viravan dikin. |
| **virçevirç** | di xwarinê de dengê ku ji lêvên hin mirov tê |
| **virçik** | xwarina ku ji hewce bûnê zêde ron dibe, çi tiştê ku ji hewce bûnê pirtir bikeve halekî jê re virçik tê gotin. Ev xwarin bûye virçik yanê zêde ron bûye, ew tişt bûye virçik, yanê xera bûye. |
| **virçiqîn** | pelixîna tiştekî ku hundirê wî nerm an ron be û bi dor de birije. Hêk virçiqî, zeweş virçiqî, virçiqîna petix |
| **virçole** | pîsik û tirsok, bê şexsiyet. Filan ne peyakî baş e, virçole ye. |
| **viridîq** | bi zirt û derewan tirsandin. Tu dixwazî min bi viridîqan birevînî. |
| **virek** | virker, kesê derewîn, ê ku her viran dike, filanê virek e. |
| **virrik** | zikê mirov an dewar, pir ron çûn. filan bi virrikê ket, pezê me virrikî bûye. Lingê wî ket virrikê. |
| **virrnî** | tiştê ku bê dem yanê dereng tê dinê, berxê virrnî, zarokê virrnî |

| | |
|---|---|
| **virrtoqî** | |
| **virrvirandin** | li ba kirin û avetineke velê ku deng jê bê, wek avetina tiştekî pehn û degirmî |
| **virrvirîn** | girbûna tiştekî pehn û degirmî, virrvirîna lastika otomobêlê. |
| **virrvirro** | kesê ku rast û derewan tevî hev dike û pir dipeyive, ji kesên pirpeyv re jî tête gotin |
| **virvironek** | tiştê sivik ku tête avêtin û li hewa di dor xwe re daş dibe û diçe |
| **viz** | |
| **vizaviz** | dengê ku ji mozan tê, vizaviza mozan e. |
| **vizek** | kesê ku di ber xwe de dipeyive û mirov serwextî gotinên wî nabe. dev ji wî berde ew vîzekek e. |
| **vîjik** | virrik, vîjik ji zikçûna mirovan tenê re tête gotin |
| **vîl** | xwîl, xûl |
| **vît** | kuş, zût, tîk, di cihê xwe de vît sekinî. |
| **vîtik** | kart, kaxeza biçûk ku tête nivîsîn, vîtikekê bidê da tiştekî nebêjinê. Ma vîtika min nagiha teş |
| **vok** | mîz, voka wî raveyî diktor kirin. |

# W

| | |
|---|---|
| **w** | tîpek ji tîpên elifbêya kurdî ên bê deng |
| **wa** | holê, wa bû, wa bike, wa here, wa çû, ev: piştî ku (ye) tê pê, waye diçe, waye bîne jî tête gotin |
| **wajîn** | waj waj, qajîn, qajqaj, dengê giriyê ku gaziyê hêvî dike, wajîna zarok |
| **wajwajok** | qajqajok, zarokê pir girî, an kesê qels ê ku di peyvê de dengê xwe ra dike û dixwaze bi ravekirina qelsiya xwe arîkaran çar bike, filan peyakî wajwajok e. |
| **walî** | kesê ku hikûmet tevdîr û tevgera êrdimekê dispêrê, waliyê rihayê waliyê şamê |
| **wan** | bajarek ji bajarê kurdistanê, wan: pironav, wan got, wan di wan bir |
| **wanî** | holê, wanî here, wanî bêje, wanî bike |
| **war** | cihê ku mirov bi mal û zarokên xwe ve tê de radiweste û dimîne, ji cihê ku koçer konên xwe datînin re jî tête gotin |
| **warqilandin** | arqilandin, ji demê an civanê bi şûn de hiştin, me ew ji rê warqiland ji lewre ne giha hevalên xwe. |
| **warqilîn** | arqilîn, ji deme an civanê bi şûn de man. em hinekî warqilîn, ji lewre negîhan ser. |
| **warxweş** | kesê ku diçe cihekî û nema dixwaze jê biçe, ji mêvanê cangiran re tête gotin, filan peyakî werxweş e. |
| **warxweşî** | cangiranî kirin, ji cihê xwe nelivîn. Bi werxweşiya wî kês kete min ango wî cih ji xwe re xweş dît û nelivî, holê kês kete min. |
| **warwêran** | kesê bê şans û yom, kû da diçe ew cih xerab dibe û bê bela namîne |
| **wax** | edata esefê, bi ber ketinê, wax li me, ango waax li me. |
| **waxandin** | bi ber yekî ketin û ji bo wî wax wax kirin. filan ji slikş dikuje û ji alikî diwaxîne. |
| **waxîn** | wax gotin, ew deng ji mirov derketin. dema mirina kurê xwe bihîst waxîn pêket. |
| **way** | dengê ku ji ber bûyîneke dijwar ji mirov dertê. edat teecib, way li min, way lo kê wa kir? |

| | |
|---|---|
| **we** | pironav, wegot, we kir |
| **wefa** | qencîbirî, li ser gotina xwe man. filan geleki wefakar e, ew peyakî bi wefa ye. |
| **wefakar** | kesê bi wefa, wefakarî, rûçikek ji rûçikê mêran e. |
| **wefat** | mirin, neman, filanê wefat kir. |
| **weh** | deng li dewar kirin, weh weh mêran |
| **wejartin** | |
| **wek** | weke, weka, wekî, mîna, nola, fena, tu jî wekî wî diki, ew her du jî wek hev in. |
| **wekîl** | cihqîr, kesê ku di kar an xebatekê de cihê mirovekî digire. heke ne li vir bim jî wekilê min li vir e. |
| **welat** | niştiman, ew erdê ku mirov jê tê dinê û tê de dijî, kurdistan welatê kurdan e. |
| **welê** | wisa, wanî, wî, welê kir, ew welê dibêje. |
| **welî** | kesê ku riya dinê berdide û her ji bo xwedê nimêj dike û ya qenc difikire |
| **wenews** | pûnijîn, ji xewê serî ketin ber. Ew diwenewse. |
| **wens** | bêhn derketin, bê heval ez nawenisim. agir di şevbêrkan de wensek mezin e. Ez bi heyîna hevalan diwenisim. |
| **weqî** | giraniya 200 dirhem, huqqeyek du weqiyên kurdmancî ne |
| **wer** | welê wa, wer nebêje, wer neke. |
| **werandin** | amîn, bêjeyên were, werîn û werîne ji vê jêderê (mesder) tên. min tu werandin, li vir bi mana daweşandinê têt. |
| **werbêj kirin** | bêtin, ji bêjingê derbas kirin, me erdê xwe werbêj kir. |
| **werbûn** | ketin, reşîn, dema (tê) ket pêşiyê dibe ketin, ma ku pê ket pêşiyê dibe reşîn, tê werbûn, di cihekî de ketin, pê werbûn: hatin reşandin, pê werke |
| **werdek** | firindeyekî avî ye ji qazê biçûktir e, ew jî çend celeb in, sersar, serkesk, serbelek, cûre, sarçele |
| **werger** | tercime, guhartina nivîsekî ji zimanekî bo zimanê din |
| **wergerr** | mitercim, kesê ku nivîsê werdigerîne zimaneke din |
| **wergeran** | wergerîn, wergeriyan, ji hêlekî veliqitîn hêla din, ji bo fikir jî tête gotin, filanê xwe wergerand ango fikra xwe guhart. |
| **wergerandin** | veliqitandin, li ser alikî veliqitandina aliyê din |

| | |
|---|---|
| **wergirtin** | li xwe kirin, wergirtina cilan, wergirtina çekan, min cilên xwe wergirtin. |
| **werhatin** | li dorê civîn û kom bûn, şagirt li dora mamosteyê xwe werhetî bûn. |
| **werimandin** | werimandin, perçifandin. Êş ket çavên min werimîne, lingê min werimîn. |
| **werimîn** | werimîn, perçifîn |
| **werivandin** | |
| **werivîn** | |
| **weritandin** | bi xap û hîlê kesek xistina kireke bi zerar. Wî ez holê weritandim. |
| **weritîn** | bi xapîn ketina kireke dijwar an bi zerar |
| **weîs** | benê ku ji mû û pembo diwûrin, ji bo pêçana baran li ber dewar |
| **werkirin** | avêtin, di cihekî bilind, reşandin tê werkê |
| **pê werke** | di ser re werkir, yanê ji ber kel an pirraniyê rijîn, avê di ser beroşê re werkir |
| **werm** | |
| **werqil** | heçî, çengelê darînî ku têxin serê werîn ji bo pê girêdanê |
| **wersele** | perçeyek, keriyek nemaze ji perçeyên laşa mirov, an dewar. lingê mirov sê wersele ne, ran, paq û pê. |
| **werz** | zeviya ku tê de zebeş û petîx tê çandin. îsal werzên me baş in. |
| **westan** | westîn, westiyan, mandî bûn. ez pir xebitîm û westam. |
| **westandin** | mandî kirin, me ew westand. |
| **wesiyet** | daxwaze gotina dawiyê li ber mirinê ku daxwaza mirov dide zanîn |
| **weswas** | ramanên ku bê sebeb tên bîra mirov û têxin wehmê |
| **weş** | xweş, bi awayê rêveçûnê ra jî tête gotin. filanê weşa wê gelek delal e, weşa bi deleli, |
| **weşan** | pêve ketin, weşana por, weşana meywe, porê min weşi. |
| **wesandin** | pêve xistin, weşandina tûyan, weşandina gûzan, weşandina hêjîran. |
| **weximîn** | tepişîn, peşimin, werima ku kêm dikeve binî |
| **wext** | dem, gav, çax, kêlî, bîst, dar midde, zeman .. wexta sewgur, wexta berbang, wexta kubara sibê, wexta dan pez, wexta nîvro, wexta bêriyê, wexta tevzerk, wexta hingûr |
| **weynek** | jina sivik ne sergiran. filanê jineke weynek e. |

| | |
|---|---|
| **weynkî** | sivikiya ku jin dike, bi peyva deresê, çivên bejnê û qûrçandina çavan, weynekiyên wê nema tê kêşan. |
| **weza** | qels, jar, xwedêyo tu xwedêki çak î, dikarî vi girî bi ceh ki, û wî çiyayî bi ka ki, bînî di ber berqirê min ê weza kî, heke tu bixwazî dikerî lê te nekiriye adet û nakî. (metelok) |
| **wezîr** | yek ji çend peyayên ku hikûmet jê digehê hev, wezîrê ceng, wezîrê dervekarî, wezîrê hindurî, serokwezir: serekê hikûmetê ye |
| **wezîrî** | wezîr bûn, hikûmet ket û wezîriye wî dawî hat |
| **wezn** | kêş giranî, wezna wî 70 kilo ye. |
| **wê** | pronav, her tiştê mê dide ravekirin, wê keçê, wê hespê, wê tifingê |
| **wêda** | wê hêlê da, ne vir da |
| **wêcar** | ew cara nas û ji demekî de borî. wê carê min tu nedîti bû. |
| **wêjîn** | dengê giriyê ku nişka ve bi zarokan dikeve |
| **wêran** | xopan, xerab, gundê me wêran bû, mala wî wêran bû. |
| **wêranker** | kesê ku wêran dike |
| **wêrîn** | wêriyan, netirsin. karîna bê tirs. Ez diwêrim, ma tu jî diwêrî? |
| **wêrt** | kur û neviyên ku bi pê mirov diketin. filan bê wêrt e yanê bê nesl e. |
| **wî** | pronav, her tiştê mêr şanî dide. Wî kurî, Wî gayî. Wî derî |
| **wîçan** | berdana kar û xebatê. Me karê xwe wiçan kir, dibistanan wiçan kir, di wiçaniya kar de deyn nayên xwestin. |
| **wiha** | holê, wanî, wiha neke, wiha çû, ji wa-ha hatiye pê |
| **wilih** | ilih, eylo, teyrekî nêçîrvan û dirinde ye, ereb jê re seqer dibêjin |
| **winda** | wenda, hunda, ne xweya û cih ne billû. Darê min winda bû. |
| **wir** | wira, ew cih, ew çûn wir, ez li wir hatim. |
| **wird** | xwendina tiştekî, pir caran li pêhev. Sofî wirdan dikêşe yanê navê xwedê dixwîne, bêjeya kêşan ji kêşana hebên tizbiyê têt |
| **wirihan** | hêwirîn, lê civîn û kom bûn |
| **wûşe** | bêje, kelîme |
| **wûtar** | bend, meqal, gotar, xîtab |
| **wûte** | peyv, gotin |

# X

| | |
|---|---|
| **xaç** | şiklê çarmêxa fillehan, selîb |
| **xaçerê** | rêya biçûk, rêya ku dewar nikare tê re biçe, tenê pez û peya tê re diçin. Me rê berda û ketin ser xaçerê. |
| **xachebîn** | xaçparêz, kesê ku bi xudatiya îsa bawer e |
| **xaçirgan** | |
| **xaçparêz** | filleyê xachebîn |
| **xaçparêzî** | xaçparêz bûn |
| **xaçxaçok** | bûkikên ku zarok çê dikin û pê dileyzin |
| **xadim** | bende, xulam |
| **xafil** | kesê ku tiştekî ji bîra dike û kes jê diçe. Ez jê xafil bûm ji min çû. |
| **xalis** | xwerû, ji rûkî, safî |
| **xalib** | serdest |
| **xalî** | vala, xir û xalî, mal ji zar û zêç xalî bû. |
| **xalîçe** | mehfur, raxerên êranî |
| **xalojin** | jinxal, jina xal |
| **xalxal** | xilxalên ku jinan dixistin lingên xwe |
| **xalxalok** | celebek giya |
| **xam** | nezan, fêrnebûyî. Ez di filan karî de xam im. |
| **xame** | keça ber zewac |
| **xarnûx** | |
| **xan** | xaniyê mezin ku rêwî lê dibin mêvan û dewarê xwe jî tê de bi cih dikin |
| **xandûq** | korcalên ku di erdê de çêdikin an çê dibin |
| **xang** | şewla ku ji tevîhevbûna çend rengan tê. Keskesorê xang jê diçe, gewriya kevokê xang jê diçe. |
| **xanik** | xana biçûk .Ev xanik têra me û dewarê nake. |
| **xanim** | xatûn, jina ku zana û bîrbir e |
| **xanî** | avahiya ku malek tê de bi cih dibe, xaniyek ji van tiştan tête pê, hîm dîwar, mezel pencere, derî, sivik, an araq, sivînek, ban, navder û çiranek |

| | |
|---|---|
| **xanok** | xirinc, neqeba her du tehtan |
| **xapandin** | bi derewan yek girêdan. Wî bi derewan ez xapandim. |
| **xapiyan** | xapîn, bi derewa kesekî hatin girêdan. Em bi gotina wan xapiyan. |
| **xapînok** | kesê ku xapandina xelkê ji xwe re dike kar û senet. Filan mirovekî xapînok e. |
| **xapok** | lepok |
| **xarezan** | tajanga ku ereban tajon û çermê wê dirêj |
| **xar** | çargav revîna hesp an dewarekê, ez xar çûm, me xar berdayê. |
| **xare** | |
| **xariz** | |
| **xarsik** | |
| **xarûk** | |
| **Xarûz** | |
| **xaşil** | piştî çêkirina law ava nişayê ku tê de dikin. Ev kinc bi xaşil in, an go hîn nehatiye şûştin, pişti çêkirinê. Min sitokura xwe xeşil kir. |
| **xatir** | rûmet, qedir, mirov seg dide xatirê xwedî. xatir xwestin: ji bo rêketinê destûr xwestin |
| **xatûn** | xanim, jina bi kêr û zana, kesê xweyî rûmet di gel xatûna xwe derdikeve gerê. |
| **xav** | tawê tenik ê sipî, tayê ne badayî, ji mirovê nepijî re jî tête gotin. Filan peyakî xav e. Ev gotin xav e. |
| **xavgewr** | kurdên Sûriyê bi diriziyan re dibêjin, kesê ku xavika gewr dide serê xwe |
| **xavik** | şaşika ku jin an mela didin serê xwe |
| **xavir** | |
| **xavî** | nepijî, negihiştî goşt bi xavî nayê xarin, xaviya wî ew êxiste destê xepînokan. |
| **xayîn** | xiniz, bêbext, bêol, xayîn xêrê nebîne. |
| **xaz** | gaz, donê gazê |
| **xazgîn** | xwezgîn, kesên ku diçin xwestina keçekê ji bo mêrekî |
| **xazî** | kesê ku diçe şerê neyaran dike |
| **xebat** | kar, kirin. Filan bi xebatê, ez çûm xebatê. |

| | |
|---|---|
| **xeber** | gotin, hay, zanîn, xebera min jê nebû, bê xebera min çû. Ma xebera te jê bû? bi xebera wî bike: bi gotina wî bike |
| **xeberçort** | peyv, kirêt, awayê peyvê, nezanîn û dilê xelkê êşandin. Filan xeberçort e. |
| **xeberdan** | peyivîn, xeber dan, sixêf kirin. Filan ji te re xeberan dide. Xeberdana wî baş e. |
| **xeberdox** | şorkar, kesê ku dizane baş bipeyive, mitekellim |
| **xeberoşk** | ew peyva ku haya guhdaran ji bûyîneke biçûk dike. Xeberoşkên filenê pir in, her tiştî dibêje. |
| **xebînet** | heyf, ma ne xebînet e ku ew bemire? |
| **xebitandin** | dan şixulandin, bi xebatkirin, xebat danê |
| **Xebitîn** | kar kirin, şixulin, Em xebitîn, lê xebitîm, ji bo çêkirina tiştekî xebat kirin, ji derve. Têxebitîn: ji bo çêkirina tiştekî xebat kirin, di nav de |
| **xebîs** | neçak, qirêj, dilçirûk |
| **xecîcok** | celebek giya ye renga reng çîçek lê dikevin |
| **xefik** | daf, feq ku pê cinawir tête girtin, rovî bi xefikê têne girtin û gur jî |
| **xeftan** | cilekî jinan e li xwe dikin, pêşî vekiriye, digehê ser şeyê lingan |
| **xefûşêwr** | tevdîr û peyva ku ji bo xistin an kuştina hinekan dibe |
| **xela** | nanxweşî, saltengî, kêmbûna zad. Sala xelayê gelek ji birçînen mirin. |
| **xelandin** | xilandin, helweşandin, vî xanî bixelîne, xelandin di rêveçûnê de xwe liba kirin |
| **Xelas** | kuta, dawî, xelas bûn, filitîn, ez li zora lingan ji nav lepê neyaran xelas bûm. |
| **xelat** | bexşîş, min ew xelat kir yanê tiştek jê re bexş kir, dayîna ku mezin dide biçûkan xelata mîr, xelata axê |
| **xelek** | qulp, xeleka zincîrê |
| **Xelendûr** | |
| **xelet** | şaşî |
| **xelifandin** | li pê xwe hiştin. Filanê çar law û keçek û gelek mal xelifand. |
| **xelitandin** | şaş kirin |
| **xelitîn** | şaş bûn |
| **xelihan** | xilîm, helwesîn |
| **xelik** | |

| | |
|---|---|
| **xeliyan** | li hevketina dil. dilê min jê xel iya. |
| **xelk** | kesên biyanî, ne ji malbatê û ne jî ji bend û hevalan. Birîne xwe bi destê xelkê derman neke. |
| **xelît** | sile, tûrê ji sixtiyan ku şerkeran barût û berikên xwe di xistinê û li pişta xwe girê didan |
| **xelîtik** | lizdanê ji sixtiyan ku têxin berîkên xwe |
| **xem** | hem, derd, kul, nekeve xema wî tiştek pê nabe. |
| **xemahî** | |
| **xemgîr** | xemgîn, kesê ku pir xeman hildigire |
| **xeml** | zînet. xeml û xêz, fantazî |
| **xemilandin** | bi zîriet kirin, bûka xemilandî, bixemiiîne |
| **xemilîn** | xwe xemilandin |
| **xeminandin** | texmîn kirin, zadên me hatin xeminandin. |
| **xemîrok** | hemî xwarinên ku şekir dikin û hiltînin |
| **xemnak** | kesê ku zû xeman hildigire |
| **xemrî** | rengê şîn e, ku ji gurika agir dertê |
| **xemûr** | |
| **xencelis** | |
| **xencer** | xencer, sileha ku ji hesin çê dikin û didin ber xwe, xencera xerzanî, pişt xencer |
| **xeniqandin** | bi destan an bi ben hilma yekî girtin û fetisandin. Tirkan gelek kurdên çak xeniqandin. |
| **xeniqîn** | fetisîn. Ew ket avê û xeniqî. |
| **xenûq** | |
| **xenûqe** | |
| **xenzirandin** | wek xanzîran xurt û serhişk kirina kesekî. Te ew xenzîrand nema vetê û guh dide me. |
| **xenzirîn** | wek beraz xûrt û serhişk bûn. Wî bê sebeb xwe xenzirandiye. |
| **xepar** | kolana dora koka dar û mewên rezan. Me rezê qewe xepar kir. |
| **xepartin** | bi nînokan kolan. Ew erdê dixepêre. |
| **xepirandin** | xepirîn, bi dest û lingan li ber xwe dan. Ew bê fêde dixepire, nikare ji destê min derê. |
| **xepirîn** | |

| | |
|---|---|
| **Xerac** | xwîk, dayîna ku hin ji hinekan bi zor distînin, dayina ku kolî didin ser destiyan |
| **Xerraf** | dolapa ku pê avê ji çeman radikin bilindcihan |
| **xerram** | tiriyên roniyê di rex hev û wek hev |
| **xerrat** | necar, kesê ku bi depan û daran dixebite |
| **xerbazî** | |
| **xerbende** | kesê ku li ser keran dixebite |
| **xerbikîn** | ji hev ketin û rê ji ber winda bûyîn |
| **xerbilîn** | ji xwe çûn, kevirek li serê min ket ez xerbititn. |
| **xerbî** | bayê ku ji roava tê û gundî bênderên xwe li ber bi ba dikin |
| **xerîb** | biyanî, ne ji xelkên cih. Ew camêr xerîb e. |
| **xerbok** | qirêka sist |
| **xerbokî** | |
| **xerc** | tayê ebirşîmê badayî ku pê pîsîrêm cilan cîn dikin, eba xerc kirî. xuftanê bi xerc |
| **xercî** | diravê ku ji bo serfkirinê ji hinekan re tête dayîn |
| **xerçeng** | |
| **xerdel** | giyayek ku bişrê wî dibe derman |
| **xergele** | ehmeqê serserî, wek kerê |
| **xergeman** | mengene |
| **xericîn** | jê derketin |
| **xeritandin** | sîrandin, xistin dûzanê û jê rakirin |
| **xeritîn** | jê hatin girtin û ketin dûzanê |
| **xermişandin** | bi mînak an tiştekî tuj perîncek kirin. |
| **xermişîn** | bi mînak an tiştekî tuj perincek bûyîn |
| **xerpiçandin** | qertilandin, raxurandina axê bi pozê tevir an merê |
| **xerxer** | qûça ku ji kevirîn, wek zebeşan digehê hev |
| **xerxere** | av di gewriya xwe werdan û deng pêxistin |
| **xerxop** | hilweşî û ji hev belav bûyî. Ev dîwer xerxop e. |
| **xerxule** | teht û kevirên mezin di çiyan de hildiweşin û di cihekî de li ser hev kom dibin |
| **xerz** | |

| | |
|---|---|
| **xesandin** | qunikê pez an dewarekê derêxistin, ji bo mêran ji çav tirsandinê re jî tête gotin. Ew hat xesandin. |
| **xesaret** | zerar û ziyan |
| **xesifandin** | li ber çavan winda kirin |
| **xesifîn** | li ber çavan winda bûn |
| **xesî** | pez an dewarê ku gumikê wî tête derêxistin. |
| **xesîs** | çikas, paxîl |
| **xeşîm** | xav, nezan, wi ji xeşînî ew tişt kir. |
| **xet** | xêz, xeta cot, xeta qelemê |
| **xeter** | tehlîke, bûyîna ku bi xesar e. Ev kira wî xeter e. |
| **xeterdar** | bi xeter, xeternak |
| **xeternak** | bi xeter, bi tehlîke |
| **Xetik** | mişar, evlek, me zevî xetikand. |
| **xetimandin** | girtina dev an riya tiştekî da ku nebare xetimandina kûnê, xetimandina coyê, xetimandina lûlikê, xetimandina rê |
| **xetimîn** | xatimîn, hatin girtina rê an kunekê ku tê re tiştek nebare. Co xetimî, lûlik xetimî, rê ji berfê xetimî. |
| **xetîre** | darên ku têxin dîwarên hişkeberê da ku helneweşe |
| **xetîrek** | cihê ku du av tê de digehên hev û ji mirov re xweya dike ku dikele. xetîrek: ronî, çirayên ku ji paçên li gaz an axa bi gaz çê dikin |
| **xetme** | |
| **xew** | nivistin, min xew têt, xewa min têt, ketin xew, di xew ve çûn, di xew re çûn, di xew ve kirin, di xew ve birin. |
| **xewalû** | xewar, kesê ku pir ji xewê hez dike |
| **xewar** | kesê pir xew. filan gelek xewar e. |
| **xewisandin** | cihê ku tê de rêwiyan bi cih dikin û bi xwedî dikin |
| **xewîşe** | qeftîşên di tehtan de |
| **xewkudke** | bê xew man, (mias) |
| **xewmaşî** | |
| **xewn** | tiştên ku mirov, di xewê de dibîne, min xewnek dît. |
| **xewxewe** | |
| **xeyd** | qehr, di nava min û wi de xeyd çê bû. |
| **xeyidandin** | qehrandin, me ew xeyidand. |

| | |
|---|---|
| **xeyidîn** | em ji wî xeyidîn |
| **xeyret** | piştgirtin, alî kirin, jê re xwestin filan bi xeyret e, ew xeyreta min dikêşe, tu di xeyreta wî de yî. |
| **xez** | bizina ku dar û dev û guhên wê sore bin, bizina xez, karê xez |
| **xezal** | asik, ji ya nê re, mamiz têtе goti n |
| **xezan** | demsala payizê |
| **xezeb** | xeyda kesekî êxistin dilê xwe, xezeb lê kirin, lê hatin xezebê |
| **xezîne** | cihê ku pere tê de tên veşartin |
| **xezîmok** | celebek giya |
| **xêç** | xêş, ji giyayê kendirê çê dibe û zad têxinê |
| **xêl** | tevayiya berbiyên ku diçin bûkekê bînin tevî dewarên xwe. em bi xêlek mezin çûn daweta wî. |
| **xêlî** | yek ji kesên ku ji xêl be. ew jî xêlî ye. |
| **xêlkî** | çawan rast te, filan xêlkî dipeyive, hemî kirên wî xelkî ne. |
| **xêr** | qencî, çakî, havil. xêra wî çi ye? xêra te giha min. min tu xêr jê nedît. |
| **xêret** | dawara bi şeref, filanê xêreta wî nîne, ew î bê xiretê, xêreta me nakêşe. |
| **xerxwaz** | qencîxwaz, filan xêrxwazê min e. |
| **xêz** | xêzik, xet, xetik, kaxeta xezkirî, wî erd xêz kir, xêza min ji ya wî rastir e. |
| **xiçviçandin** | |
| **xidirnebî** | |
| **xidûk** | |
| **xilaf** | dubendiya ku dikeve navbera hinekan. xilaf ket nava me û wan. |
| **xilêf** | pûstikê çavan, xilê! perçitî. |
| **xilinzer** | |
| **xilisandin** | şemitandin. me ew xilisand. |
| **xilisin** | şemitîn. erdi şil bû lingê min xilisî. |
| **xilmaş** | nîv xew, ew xewa ku nuh dikeve çavan, lê dengên dora xwe dibhîse. ez nuh xilmaş bûbûm ku deng li min kirin. |
| **xilolîk** | xilorik, ji goştê kutayî û danhûrkê çê dikin giro ver in |
| | 303 |

| | |
|---|---|
| **xiloxe** | sist, vala. ev dar xilaxe ye li ber xwe nade, serê wî xilaxe ye tişt tê nîne. |
| **xilisandin** | |
| **xilt** | ne xwerû tevliheviya çend celeb tişt. zadê me xilt e. |
| **xilwe** | bi tenê mayîn, vala bûn. ez pê re xilwe bûm. |
| **xilxile** | erd an riya ku kevirên biçûk tê de pir bin û dema tê ra derbazbûnê deng ji livîna keviran bê |
| **xinamî** | mirovatiya di aliyê jinê ve. ez û wî xinamiyên hev in. |
| **xinaq** | gewrî, qaqirîçik. min bi xinaqa wî girt û qewrî jê şiwa kir. |
| **xingirîn** | xinqilîn, bi aflazî meşîn. refê keçan li pêş dibistanê dixingirî. ev çi xingirîn e. |
| **xiniz** | bêbext û bêol, xaîn |
| **xinizî** | xaînî, bêbextî. xiniz! ji wî bû. |
| **xiplak** | |
| **xir** | vala, xalî, cihê ku kes tê nîne. ez çûm wî xenî kes tê ne bû û xir û xalî bû. |
| **xirr** | kîr, ji ên mezin re tête gotin |
| **xira** | kesê ji xwe razî, oflaz |
| **xirab** | alos, wêran, wi tifinga min xirab kir, wan mala me xirab kir. |
| **xiram** | di çiyan de cihê pir kevir ku tê de ger dijwar be |
| | 304 |
| **xiran** | xirihan, xirîn, di nexweşiyê de ji xwe çûn. |
| **xirandin** | yek ji heşan birin û gêjkirin |
| **xirar** | çi walê mezin ku zad têxinê lê dewar nikare rake carnan pê kayê dikêşin |
| **xirbe** | gundê ku tête berdan û xaniyên wî hildiweşin xirek |
| **xirikandin** | rakişandin, min ev dar bi erdê re xirikand. |
| **xirikîn** | rakişîn |
| **xirindal** | |
| **xirindol** | |
| **xiring** | |
| **xirmişandin** | xirpişandin, pirîncek kirin, pisîkê destê min xermişand. |
| **xirmişîn** | xirpisîn, pirincek bûyîn, destên te xermişîne. |

| | |
|---|---|
| **xirmûşek** | pirinçek, nînokên pisîkê an çi ni'nokên tûj ku bi kêrî xermişandinê tên |
| **xirnik** | çêlikê kevrûşk, xirnikê kevrûşkan nikarin birevin. |
| **xirp** | xirpîn, dengê ku ji kunbû na tiştekî têt. min kêra xwe da ser dep got xirp û kun kir. xirpîna kerê ye qaşikên zeweşan dixwe. |
| **xirpe** | |
| **xirpo** | kesê ehmeq ku hergav tête xapandin |
| **xirşikandin** | rakişandin, wî ez xirkişandim. |
| **xirkişîn** | rakişîn. ew min di xirkişîne |
| | 304 |
| **xirte** | xerte erdê pirêze an geng ku tê çandin. şûvên min neman, min jî hinek zadê xwe xirte çand. |
| **xirteng** | newala kûr a di navbera du çiyan de, xirtenga genderê |
| **xirtik** | xirpik, livok, xirtika dest, xirtika ling |
| **xirtikandin** | kolana di rûve. me rezê xwe xirtikand. ew bîstên dixirtikîne. |
| **xirtol** | |
| **xistin** | avêtin, danîn, me hev girt. min ew xist. xistin ber xwe. xistin ser riya rast, ji riya rast xistin. |
| **xirûm** | depê ku sirîtê konan têre diborin û dişidînin |
| **xirpe** | serpiyê ku pembo têxin nava rûber û astar û deraw dikin. kal û pîran li xwe dikirin |
| **xişik** | qupiya pembo berî ku vebe gûzik e, lê gava vebû û tê re pembo sipî kir dibe xisik |
| **xişîn** | dengê ku ji pelk û giyayê hişk têt. mar xuşî, bû xişine giya. |
| **xişor** | agirê ku gurik jê tê birîn û tev de dibe kozên hûr û xaliya germ |
| **xişr** | gişt çi tiştê ku ji zîv û zêr çê dibe û jin xwe pê dixemilînin |
| **xişrûg** | teyrek, zîpika hûr ku wek libê nîskan an hûrtir |
| **xisrûk** | celebek giya |
| **xişt** | hesinê ser tuj ku şêxik li zikê xwe didin. şêxikê bi xişt milletê min kuşt |
| **xiştlk** | çi kesê ku xwe siq û tûj digire. filan î wekî xiştikan e. |
| **xişxiş** | dengê xişînê bi awakî xurtir. beraz ketiye dehlê û xişxişa lingê wî tê |

| | |
|---|---|
| **xişxişok** | kizkizok, kesê ku ji bo her tiştekî xwe dixeyidîne û xeyda xwe ji bîra nake |
| **xitî** | ev cûrê avî yê mezin |
| **xitme** | temam kirin, wî Quran xitme kir. |
| **xiyanet** | xinizî. ji ber xiyaneta beg û axan em ketin bin destê neyaran. |
| **xiyar** | celebek keskayî ku tête xwarin, cacixa xiyaran, tirşiyê xiyaran |
| **xizan** | belengaz. feqîr, kesê xizan her gav dibe leyistoka dewlemendan |
| **xizanî** | belenqazî, feqîrî, xizanî malkambaxî ye. |
| **xiztik** | . |
| **xizmet** | kira karekî ji bo hinan, ez di xizmeta te de me. |
| **xizmetkar** | xulam, kesê ku debara xwe di riya xizmetê xelkê de dertêxe |
| **xizxizok** | xilxilok. xişrûg. şîpikên hûr ji nîskan biçûktir |
| **xîç** | xiçik, kevirê ji nîskan biçûktir, di nava qumê de |
| | 305 |
| **xîşk** | |
| **xiştilandin** | bi serveyanîn, lingê min şewitî û çermê wî tev de xîştiiend. |
| **xiştilîn** | bi serve hatin, çermê destê min ji ber şewatê xiştilî. |
| **xizan** | |
| **xîzar** | birêka ku pê depan dibirin |
| **xopan** | xirabe, wêran, wî mala me xopan kir. |
| **xort** | ciwan, law, sîpe, emrê di navbera 15 û 30 salê de |
| **xortanî** | dema xortbûnê |
| **xox** | meyweyê çeftelî |
| **xezan** | biyanî, xerîb. ew peyakî xozan e. |
| **xozanî** | biyanîtî, xerîbî |
| **xubar** | xubarîn, xubare, zadê ku payizê berî ketina baranê tête çandin. zadê me xubar in. |
| **xuda** | xwedê, yezdan |
| **xudan** | xwedî. ez xudanê vî pezî me. |
| **xulam** | xizmetkar, kesê ku karê mirov dike |
| **xularnkole** | peyayê ku di şer de dîl dikeve destê mirov |
| **xulîndor** | penîrê ku ji şîrê fira çê dibe |

| | |
|---|---|
| **xulq** | bêhna dil, filanî xulq teng e, xulqê xwe lê teng neke. |
| **xumam** | dûyê wek mij an moranê ji ewran datê erdê |
| **xurnalî** | |
| | 306 |
| **xumalîk** | |
| **xumandin** | bi deng berdanê. baranê xumandiyê. bi tifingan me xumandê. |
| **xumîn** | dengê ku ji hev nayê birîn, xurnîna avê xumîna baranê, xumîna topan. |
| **xumirîn** | |
| **xumyan** | çêj bûn, dewixîn, wî derman xwar xumyan bû, nema dikare bilebite. |
| **xumre** | giyayeke di ber çeman de bosteke bilind dibe, tav û belgên wî hişk dikin ji bo derman. Xumre kuleke li bin çenê di gewriyê de têt, tirk jê re yilancik dibêjin |
| **xumrî** | rengê sor ê tarî û reş e |
| **xumsî** | avav |
| **xunav** | ava ku şevên biharê bi ser belgên giya û gulan dicive, ji barana gelekî hur re jî têt gotin (bandev) |
| **xeniqandin** | |
| **xuniqîn** | |
| **xunivandin** | germ, parkirin, xistin xwîdanê. elo serma girtiye me ew xunivand. |
| **xunivîn** | germ porr bûn, ketin |
| **xwîdanê** | ez di nivinê de xunivîm. |
| **xunkar** | hakim, mezinê ku her tişt bi destê wî, padîşah kesê ku girtin û berdana welatekî bi dest de be |
| **xunkarî** | hakimî, mezinatî, padîşahî |
| **xur** | ji ber qirêj an hin nexweşî ji laşa mirov çar dibe û mirov bi tilî an nînokan xwe dixurîne. Xur dema kewan didin ber hev ku bixwînin re ji xura kewan tê gotin |
| **xurandin** | bi destan xura yekî jê birin. dewar xwe bi diranan dixurîne. |
| **xurb** | birek kesên ku her hinek ji alîkî bin û ji hev re biyanî bin |
| **xurbet** | çûna cih û welatên xerîb |
| **xuribîn** | ji welatê xwe bi derketin û li welatên biyanî gerîn. ez xuribîm. |

| | |
|---|---|
| **xurcîn** | xurcirîn, heqîba ku diwar davêjin pişt xwe û hûr û pûrê xwe têxinê |
| **xurde** | hûr, diravê hûr, vî sed kaxetî ji min re xurde kin, diravê xurde |
| **xurdebîn** | xurdenas, ew dîndoqê ku pê nivîsan an tiştine pir hûr tête dîtin |
| **xurdik** | xurdek, ji zirêçê biçûk ji bo nêçîra teyran çê dikin, xurdikên xezalan mezintir dibin, saçme |
| **xure** | |
| **xurek** | kesê ku pir dixwe, filan peyek; xurek e. |
| **xurîn** | kesê ku ji ber pîrbûnê eqlê wî tevlîhev dibe. kalo xurifiye. |
| **xurifîn** | ji ber pîrbûnê eqil sivik bûn. ev hirç xunfîne. |
| **xurimandin** | westandin an ji cih derêxistina lebatekî. wî destê min xurimand. mum kirin û jê derbas kirin. şeşara min ev dep xurimand. |
| **xurimîn** | westîn û ji cih livîn, kun bûn. destê min xurittuye. rana min xurimiye. |
| **xuriyan** | xur, gihanê min xwîdan da û pista min xuriya, an dixure. |
| **xurî** | nexweşiya ku ser û çav û çermê laşê kirêt dike. filan î serçav bixu riye. zarok xurî derêxistin. |
| **xurîn** | kesê sibê zû nan nexwe ew xurîn e. di sibê ve hê ez xurînim. |
| **xurînî** | xwarina ku sibê zû tête xwarin. min xurîniye xwe kir. |
| **xurme** | meywekî şêrîn e, li germiyanan dibe. dîrok dibêje demekî li şengalê jî darên xurman gelek bûne |
| **xurnîf** | giyayeke li çolê dibe û berê wê ji bo hin derman bi kêr tê û ew jî tête şewitandin |
| **xurt** | bi qewet, li ser xwe, ne qels, filan mêrekî xurt e. |
| **xurtî** | xurt bûn, serdestî. ew dixwaze xurtiyê li min bike. |
| **xurxuronek** | ava ku di cihê bilind de tête xwehr û dengê xurt jê tê, sûlav, şe lale |
| **xusar** | |
| | 307 |
| **xusar** | |
| **xusî** | şevnem, ava ku biharê bi şev dikeve ser giya û tiştên dereban |
| **xuşandin** | xuşikandin, tiştek di erdê re tar kirin, rakişandin. Min destê wî girt û xuşand. |
| **xuşikîn** | di erdê re xuş bûn, hatin xuşkirin, xusikandin. |
| **xusîn** | xuşxus, dengê ku ji herîkîna avê tê |

| | |
|---|---|
| **xuşînek** | cihê ku zarok xwe pê de xuş dikin an cihê ku darên mezin an pistiyan tê de li pê xwe radikêşin. Me piştiyê xwe di xuşînekê re rakişand. |
| **xuşkî** | zibil, rêx: yê çelekan, bişkul: pez û dewaran, serkul: ker hesp û hêstiran, şirç, şelq: yê teyran |
| **xuya** | xuyan, tiştê ku ji çavan diyar, ku di rastiya wî şik nebe. Ew di me ve xuyan e, xuya ye dilê te nîne ku heqê min bidî. |
| **xûd** | kilox, qehf, xûdê serî. |
| **xûl** | xwîl, ji alî kî xwehr, wî kumê xwe xûl kiriye, ji elîkî xûl bûye. |
| **xûz** | piştgoh, pişta wî xûz e. |
| **xwar** | wî şîv xwar |
| **xwarde** | kesê nade pêş û paş û tenê roja xwe xweş dibore |
| **xwal** | birê dê |
| **xwalet** | |
| **xwarin** | ji rêya dev tiştek derbasî zik kirin. Min taştê xwar hespê ceh xwar, gur mih xwar. |
| **xwarinî** | tiştê ku tête xwarin |
| **xwarûfk** | firaxa ku pê avê vedixwin |
| **xwarûvajî** | xwehr û vaca, ne rast. Filan xwarûvajî dipeyive. |
| **xwazekar** | kesê ku her xwestin kiriye karê xwe |
| **xwarzê** | keça xwehê, xwarzêya min çû Misrê. |
| **xwarzî** | kurê xwehê, xwarziyê te li şamê tê. |
| **xwazok** | kesê ku çavên wî ji destê xelkê û bi nizmî dixwaze, çavkur |
| **xwedê** | yezdan, huma, xwedê zane, xwedê qirevî, xwedê agah e |
| **xwedî** | malik, ez xwediyê vî pezî me. |
| **xweh** | keça ku ji bav, an dê an herduyan dibe, xweha ji bavê, xweha ji dê, xweha ji bav, xweha ji dê |
| **xwehr** | ne rast, çi tiştê ne rast be, xwehr e |
| **xwelî** | arî, xweliya êzingan, xweliya sergînan |
| **xwelîmermotk** | xweliya ku hîn bizotên agir ên hûr bêne dîtin |
| **xwemal** | milk. Ev xanî xwemalê min e. |
| **xwenda** | kesê ku dizane bixwîne, filan xwenda ye. |

| | |
|---|---|
| **xwendin** | xwendina tiştekî awayê xwendinê. Min xwend, ew dixwîne, xwendina wî baş e. |
| **xwendî** | kesê ku ji bo dawetekî hatiye vexwendin. xwendiyên me çûn bûkê bînin. |
| **xwepîşandan** | mizahere, ji bo daxwaz an ramanekê bi hev re bi awayekî minezem derketina pir mirovan û daxwaza xwe xwestin. |
| **xwerû** | ji rûkî, safî |
| **xweser** | tiştê ku ji bo yekî tenê be, xususî., ev otomobêl xweser e, ev cih xweser yê min e. |
| **xwestek** | tiştê ku tê xwestin, xwesteka min ji te ev hesp e. |
| **xwestin** | sitandina tiştekî dil kirin. Min şeşaşa wî jê xwest lê neda, bixwaze dixwazim. |
| **xwestî** | kesê ku tiştekî dixwaze. Xwestiyê wê keçê ez bûm. |
| **xwesû** | xwesî, xasî, diya jina mirov |
| **xweş** | çak, baş, geş, rihet. Ev xwarin xweş e, ez xweş im. |
| **xweşav** | ji mewîj û meyweyên hişkirî çê dibe û bi sarî tête xwarin |
| **xweşcivat** | kesê xweşpeyv ku civat guhdariya gotinên wî dike |
| **xweşewîst** | ezîz, pirqedir, xweşewistê min filan. |
| **xweşik** | gelek xweş û şêrîn. Ev xanî î xweşik e. |
| **xweşîl** | giya pirşîr e, dema şîrê wê digehê laşa mirov gelekî dixure û dişewite |
| **xweşîn** | xweşiyan, di rûyê erdê re xuj bûn û çûn xweşîna zarok, xweşîna avê, Ev zarok dixweşe. ji dengê avê re jî xweşîn tête gotin: xweşîne avê tê. |
| **xweşkêş** | |
| **xweşkok** | gelek xweş lê biçûk |
| **xweyî** | xwedî, ew ji bê xweyitî mir. |
| **xweyîtî** | xwedîtî, lêbûn xwedî. Ew xweyitiyê li me nake. |
| **xwezgînvan** | xwezgîn, kesên ku diçin keçekê bixwazin |
| **xwezgînî** | bi karê xwezgîn, rabûn, çûn xwestina keçekê |
| **xweziyandin** | xweziya xwe pê anîn, min ew pir dixweziyand. |
| **xwezî** | ava ku di devê mirov de, Min nikaribû xweziya xwe daqûrtînim, xwezî ew bihata, ez xweziya xwe pê tînim. |
| **xwezîm** | |

| | |
|---|---|
| **xwezok** | kesê ku her xweşiya xwe bi kir û debara xelk tîne |
| **xwezûr** | bavê jina mirov, xwezûrê min bavê jina min e. |
| **xwê** | têxin xwarine, şîva me bê xwê ye. şîva me bi xwê te. şîva me pir xwê ye. |
| **xwêdan** | xwê dayîna pez, roja ku tê de pez xwê didin. Sibe xwêdana pezê me ye, em diçin xwêdanê. |
| **xwêdank** | firaxa ku xwê têxinê û datînin ser sifrê |
| **xwêjink** | |
| **xwêrang** | cih an tehtên ku xwê li ser didin pêz |
| **xwêreng** | celebek kevir hene ku di rengê xwê de ne |
| **xwîn** | xwên, xûn, ava sor ku ji laşa mirov diçe, ew ava ku jîna mirov pê ye, xwîn jê berdan, xwîn deyîn, xwîn standin |
| **xwînpere** | berî ku dûr vê zarok çêbe xwîna ku di cîzarok de |
| **xwînkel** | kesê ku zû dixeyide û hişk. Filan xwînkel e. |

# Y

| | |
|---|---|
| **yabo** | bavo, yabo çû bû bajêr îro hat. |
| **yacûc** | bejn bostikên ku efsane dibêje dê di dawiya dinê de rabin, yacûc macûc |
| **yanison** | heboran, giyak e, ava bizrê wî têxin ereqê û ava wê wek çayê jî vedixwin |
| **yar** | dost, hogir. Ez û wî yarê hev in, ji pirsa xwe re yar bûn. |
| **yarî** | henek, qerf. kuşetî. |
| **yarîker** | kesê ku qerf û henek û yariyan pir dike |
| **yek** | jimara 1ê, xwedê yek û gotin yek, yek: ew tiştê ku xweya, salixdayî, hatî zanîn. Ev yek çire wa bû. Ev yek nehata serê me. |
| **yekane** | nerazê mêr yê qert û xurt, ji mêrê çê re ji tête gotin. Filan yekanekî mêran e. |
| **yekbûn** | bûn yek, ji kurdan re berî her tiştî yek bûn divê. |
| **yekîtî** | yek bûn, yekîtî kilîta serdestiyê ye. |
| **yekşem** | kîrakî. roja dudiyê heftê, şemî, yekşem, duşem,sêşem |
| **yekwesle** | yekwersele, yekpare, perçeyek û xurt |
| **yeman** | jehatî, filan peyakî yeman e. |
| **yerdeg** | tiştê ku zêde bi xwe re bibî cîkî. Wî hespek jî bi xwe re yerdeg birî bû. |
| **yexte** | hespê xesandî, bê gûn. Min hespê xwe yexte kir. |
| **yextîrme** | hespê ku siwarê wî dikujî û distînî. Me bîst hesp yextirme enîn. |
| **yezdan** | xwedê, huma, yezdan, elîkerê te bî. |
| **yezde** | navê jinan e, bi mana ebda xwedê tê |
| **yezdo** | navê peyan e, bi mana ebdê xwedê tê |
| **yom** | hatin, filan bê yom e, yanê hatina wî bê xêr e, yomê wî li me nehat, yanê hatina wî ji me re xirabî anî. |

# Z

| | |
|---|---|
| **zaboq** | Qeftîşa teng, rêya teng ku di nav du kevirên mezin re bibore |
| **zac** | dermaneke pê rengê reş çêdikin |
| **zad** | tevayiya ceh, genim û garis ku jê nan çê dibe. îsal zadên me nebaş in. |
| **zahid** | kesê ku dev ji kar û xebata dinê berdide û dema xwe bi nimêjê dibore |
| **zahir** | rûve, şahirê wî xweş xweya dike lê ya rast ne peyekî baş e. |
| **zal** | |
| **zan** | zayîn, çêlik an zarokan anîn, hespa min za, kera min dizê. |
| **zandûr** | di navçava çiyan de qeftîşên kûr ku carina berf jî tê de dimîne |
| **zanîn** | ilim, min zanî, ew dizane, hûn dizanin, zanîna wî ne ew çend e. |
| **zar** | ziman, lehçe, kurmancî zerekî zimanê kurdî ye, zarê kurdmancî, |
| **zar** | qey ku, zar tu neçûyî? |
| **zarava** | lehçe, zaravayê me ji yê we xweştir e. |
| **zarezar** | bi zimên qelsiya xwe rave kirin, wî qelekî zarezar kir lê min guh nedayê. |
| **zarîn** | giliyê xwe bi deng û girîn kirin. zerîne wî diçûn ezmanan. |
| **zarro** | biçûkên mirov, zar û zêç, zarok |
| **zatîk** | cejna filan |
| **zava** | mêrê keç an xweha mirov zavayê mirove, kesê nû zewicî heya sê rojan jê re zava dibêjin |
| **zax** | xwe mezin girtin, we dikan xwe gij û xişt kirin. ev çi zaxa te ye tu çiqas bi zaxi, zaxa wî şikiya |
| **zaxor** | di çiyan de cihê pir kevir ku pêgera wî dijwar |
| **zaxwarî** | wek şaxan xwe mezin û gij ravekirin |
| **zayîn** | zarok anîn, zayîna jinê, zayîna hestirê |
| **zeb** | |
| **zeber** | |
| **zebeş** | meywekî werzan e, zebeşên amedê gelek baş u mezin in. |
| **zebloq** | |

| | |
|---|---|
| **zebûn** | qels, jar, tu gelekî zebûn bûye. |
| **zebûnî** | qels bûn, jar bûn |
| **zegr** | |
| **zehf** | pirs, gelek. malê wî zehf e. mêvanê me zehf hatin. |
| **zehman** | gorr, tirb |
| **zehmet** | west dijwarî, me zehmet bi te kir. |
| **zehr** | zili, zerf, tasika ku ji zîv an zêr çêdikirin û fincanên qehwê an kasikên çayê dixitinê, zehr, zehra tawlê, şeş û beş |
| **zehferan** | dermanekî zer e, têxin xwarinê |
| **zeken** | sitêm, saw, ez zekemî bûme, ez bi zekemê ketim. |
| **zelal** | ne şelû, ava kaniya me zelal e. |
| **zelilandin** | reng vekirin û sipî kirin. me cilên xwe dan şûştin û zelilandin. |
| **zelilîn** | rengvekirî û sipî bûn. demekî dirêj derneketim ber royê ji lewre zelitim. |
| **zeliqandin** | nûsikandin, zeliqandina kaxetan bi diweran ve ne tiştekî baş e. |
| **zeliqîn** | nûsikîn, pirçêmik bi banê şikeftan ve dizeliqe. |
| **zelîl** | sernizm, sito xwehr, filan mirovekî zelile. |
| **zelûl** | dilşikestî, zelûliya wî ji ber mirina kurê wî ye. |
| **zeman** | dem, çax, hîng, zeman bi me re baş nehat. |
| **zembelîlik** | şemşîlik, zivistanê ava ku bi teht û sivînekan de tê û dicemide. sivînekan zembelîlik girtine. |
| **zemt** | girtin û xisti n bin destê xwe. min ew zemt kir. |
| **zemkirin** | xistin bin quweta xwe. ji zemtkirina wî re mêranî divê. |
| **zen** | şivîşkî, sik, min zena xerab jê bir. |
| **zenbelîşk** | nazbalîfk, nezbalgiha ku ji purta mirîşkan tête çêkîrin |
| **zend** | navbera livoka dest û enîsk. ha seqî, seqî, saqî berve min tê diloqî, heyrana zendê qewrê tê de bazinê dîndoqî (dîlok) |
| **zendedar** | |
| **zendek** | zendik, ji bo ku di dema xebatê de devmilên cillan qirêj nebin ji cawê reş tûrika du kirasên bi biznik dikşînin ser |
| **zengil** | ji tûnc çêdikin deng jê tê, şengilê dêrê, çan |
| **zengilok** | zengelor, zenbelor, girêka ku di qaqirîçka mirov de, jê re borbork jî tête gotin |

| | |
|---|---|
| **zengelûk** | celebek şêranî, ji hevîr çê dikin û têxin aqitê şekir nava wê vala ye |
| **zengû** | rikêla ku siwar lingê xwe têxê û siwar dibe, tenayê zengû zerrîn. |
| **zengûle** | zengilê biçûk ku tênin sitoyê pez an dewar |
| **zeqif** | dirêjkî min di jor de xwe seqif berda ser. |
| **zer** | rengê royê an zerka hêkê. pelkên çîçek mastikan zer in. |
| **zerave** | zeraqe |
| **zeravî** | şopa zeriyê an zer bûnê |
| **zerde** | xwarineke ji goşt û birincê çê dibe |
| **zerelî** | meyweyeke zer û biçûk e, li çiyan gelek in |
| **zere** | rengê berve zer |
| **zerebî.** | |
| **zerek** | |
| **zerêle.** | |
| **zerg** | dirêjê bûn, me xwe zergê kir. |
| **zergoz** | dareke belkên wê wek belkên gozê ne lê biçûk û bê ber e, belkên wê ji bo rengan bi kêr tê |
| **zerik** | piyan, tas, zerikek av bîne, zerik nexweşiyeke ku pê çermê mirov, heya bi sipiçika çavan zer dibe, bi vî navî nexweşiyek pêz jî heye |
| **zerikî** | kes an peza ku bi nexweşiya zerikê dikeve |
| **zeriqîn** | |
| **zerisk** | |
| **zeriyan** | berve zewalê çûn, ro zeriya. |
| **zerî** | jin an keça daylan û çeleng. keçê, her tu zeriya min î. |
| **zerket** | |
| **zerketav** | |
| **zerkew** | teyrekî wek kew lê renge zer û qijbelek e |
| **zernîx** | celebek jehr |
| **zerpiçî** | kesê rengê wan zer û miçiqî, filanî zerpiçî ye. |
| **zerzabîq** | |
| **zevî** | erdê avî di ber malê de |
| **zevidar** | |
| **zewd** | |

| | |
|---|---|
| **zexîre** | zadê ku ji bo xwarina salê têxin malê. îsal zexîra me kêm e. |
| **zexm** | xurt, filan peyakî zexm e. |
| **zexmik** | qayişa ku pê zengû bi zîn ve tê girêdan |
| **zexmî** | xurtî |
| **zexronek** | tepik, ji bo girtina cinawir di ber kuna wî de erd tête kolan û ser bi du depan tête girtin, dema derketinê gava pêlê dike dikevê û nema dikare jê derkeve |
| **zext** | bizmarê tûj ku têxin dawiya misasê û pê gan dajon, Du seriyên misasê yek lawût û yê din zext e. |
| **zexel** | yê ku ji ber kar direve an xwe dide alî |
| **zexelî** | kîlekarî ji rastiyê revîn, ez bi wî re naleyzim, ji ber ku zexeliyan dike. |
| **zey** | keça ku dibe bûk û diçe cihekî dûr jê re zey tête gotin. zeyyek me li filan gundî ye. |
| **zeyî** | mak, mêşhingivê a ku jê re melîke tête gotin |
| **zeyîtî** | vegera bûkê li mala bavê cara pêşîn piştî zewacê |
| **zeyt** | danê zeytûnan, zeyta çiyayê kurdan pir baş e. |
| **zeytûn** | berê darê ku zeyt jê tê derêxistin. zeytûnê ki/sê gelekî baş in. |
| **zêdahî** | tiştê ku ji mirov zêde dibe. ev ji zêdehiya filan kes e. |
| **zêde** | ji hewcebûnê pirtir çi be zêde ye, lê zêde kir, jê zêde kir |
| **zêrr** | madenê giranbiha ku dirav jê çê dibe, dibe xişir jî bazinê zêrinî |
| **zêrraser** | zerraserî |
| **zêrevan** | kesê ku ji tiştan hur û kûr dibe, filan zêrevanekî hêja ye û tu resti jê winda nabin. |
| **zêrevanî** | ji tiştekî hûr û kûr bûn û çêyî û xerabiya wî hîn kirin. bi zêrevanî hemî restî dertên ber çavan. |
| **zêrihandin** | |
| **zêrihîn** | |
| **zêrhelî** | şêrkirî, xencera wî zêrheiî ye. |
| **zeringer** | zêrker, kesê ku bi çêkirina tiştên zêrînî mijûl dibe |
| **zêrî** | zêrû, zax, kurmekî avî û xwînmij e, ji bo girtina xwînê berra xwe didin |
| **zêrzernîn** | cihên binerd |

| | |
|---|---|
| **zêw** | roja ku tê de misilman diçin ser gora miriyên xwe. serê mehê zêwa me ye. |
| **zêwî** | |
| **zibare** | |
| **zibil** | ters, serkul, biskul, rêx, virik, vîjik, sergîn, tepik, sergo |
| **ziberced** | celebek gewher |
| **zicêf** | keviyên dirûnê ku jê tên wergerandin, wek devlingê pantilonan |
| **ziç** | pilîşk, qirêja ku di kaniya çavan de digehê hev |
| **ziçiyan** | pilîşk girtina çavan, çavên min ziçiyane. |
| **zift** | qîra ku pê rêyan çê dikin |
| **zih** | zi, tan, zam, dewar ji levan bi şande cihê sor. ziha hespa min çiriya. |
| **zihim** | |
| **zik** | til, ji berdilkê heya berzikê, cihê ku ûr û pirtik tê de. zikji hev êşandin, zik ji hev qetandin, rebenê zikê xwe zik dirrî. |
| **zikak** | şeqam, kolan, di zikekê de ew ket destê min. |
| **zikakî** | kesê ku pir derdikeve zikakê û nikarê li mala xwe rûne |
| **zikat** | qasek xweya ji malê xwe dan belengazan |
| **zikês** | nexweşiyeke, zantarî |
| **zikêşî** | kesê ku bi zikêsê dikeve, ez zikês; bûme. |
| **zikmakî** | di zikê dê de, filan ji zikmakî ker e, an lal e, yanê dema ji diya xwe bûye ev kêmî pê re heye. |
| **zikxuşkî** | li ser zik xuş bûn. zikişkî min xwe gihande hevalan. |
| **zikreş** | bi rik û kîn, kesê ku ya ne qenc di dilê xwe da dihêle, nikare di kira kesî bibore. çiqas bi dev xwe bike jî zikreş e. |
| **zikreşî** | bi rik û kîn bûn, zikreşiya wî nahêle ku bibe xweyî heval. |
| **zikunî** | |
| **zil** | qirş, tayekî giya yê hişk, zilekî bide min ku pê ber diranên xwe pakim. |
| **zilam** | peya, çend zilam hatin? ew ne zilam e. |
| **zilamok** | peyayê bekêr. ew ne zilam e, lê zilamok e. |
| **zile** | |
| **zilenbe** | |
| **zithimîn** | zerbûna serçavan, rûyê wî zilhimiye. |

| | |
|---|---|
| **zillik** | zillê biçûk |
| **zilindar** | giyakî yekbostî û berê wê bi qasî gozan e û tehle birînên ku kurm dikevinê pê derman dikin û kurman dikuje |
| **zilkav** | cihê ku avzêm be û tê de giya bilind dibe |
| **zilm** | zînat, filanê zilim li min kir. |
| **zilûke** | |
| **ziman** | ew perçê goştê ku di dev de û mirov pê dipeyive, zimanê kurdî, zimanê erebî |
| **zimanok** | zimanê biçûk ku li ser devê qaqîrçki |
| **zirnrût** | celebek gewher |
| **zina** | gayîna jineke biyanî |
| **zinar** | kevirê mezin |
| **zinc** | holika ku pişta wê piştmasî be |
| **zindan** | hepis, çal. cihê ku xelkê tê de hepis dikin |
| **zindî** | ne mirî, xweş |
| **zingar** | zengarî, pasikî |
| **zingazing** | dengê ku ji zengil an madenekî tê, zingazinga zengilan |
| **zingirîn** | |
| **zi ntot** | |
| **Zipik** | |
| **Ziqaf** | du gavên pêş derî, dergeh pêşderî, sola xwe li ziqafa malê deyne. |
| **Ziqûm** | dara hillorê |
| **zirr** | şûgir, zirbav, zirxezûr, zirxwesû, zirbûra |
| **zirav** | ne sitûr, tayê zirav bejna zirav |
| **zirav** | xurtiya dil, filan bê zirav e, zirava wî qetî. |
| **zirrazirr** | zirrîna kesê, çi zirrzirra wî ye. |
| **zirbav** | mêrê dê zirrbav e |
| **zirçik** | |
| **zirçone** | kesê eqilkêm û berredayî ku xwe di rêza camêran de nagire |
| **zirrelat** | lat an zinarê mezin |
| **zirreker** | kesê ku bi ehmeqî xwe têxe nav tiştan. Ew dixwaze bi zirrekerî îşê xwe biqedîne. |

| | |
|---|---|
| **zirremêr** | peyayê ku di kirên xwe de made paş û pêş. Filan zirremêrekî peyan e. |
| **zirêç** | qurşûn, berik û xurdek ji zirêçê çê dibin |
| **zirh** | |
| **zirhok** | |
| **zirihan** | axaftin û werimîna birînekê, birîna min zirihaye. |
| **zirrîn** | zirrzirr kirin, zirîna kerê |
| **zirrrmam** | birayê bav ji dê |
| **zirne** | aletekî sar e def û zirne |
| **zirqitik** | teyrekî wek qitikan e |
| **zirt** | fort, peya pesin, filan bi zirt e. |
| **zirtavî** | |
| **zirteçoyî** | zorbazî, bi zora ço karê xwe meşandin |
| **zirtek** | kesê bêkêr ku tenê dizane zirtan bike |
| **zirtemêr** | kesê ku bi zirtan xwe têxe çavên xelkê |
| **zirrtilî** | |
| **zirtik** | kesê ku ji xurtan re şemşeqan davêje û mellaqiyan dike |
| **zirtole** | kesê ne tewa û bê rûmet. dev ji wî zirtoleyî berde. |
| **zirtxane** | cihê ku tê de canbaziyê dikin |
| **zirrxezur** | bavnariyê jinê,an yê mêr |
| **zirxwal** | birê dê ji dê |
| **zirxwesû** | damariya jinê an ya mêr |
| **zit** | zîti k, pîna ku mirov di pora li yekî de. Ev hestir dide zîtan, zîtikan davêje. |
| **zivir** | ne hillû ne nerm, hişk û bi girûz. destê jinan nerm û hillû û yê mêran zivir e. |
| **zivirandin** | vegerandin, min ew ji rê zivirand. |
| **zivirîn** | vegerîn, ez zivirîm tu jî wî bizivirîne. |
| **zivistan** | demsala ku tê de serma tê û berf û baran dibare |
| **ziving** | ezmanê dev, bi sala germ zivinga min sewitî. |
| **zivronek** | fetlonek, çi tiştê li dora xwe xurt bizivire, dinê zivronek e. |
| **ziwiq** | cihê teng û kûr, di çiyan de ziwiq pir in. |

| | |
|---|---|
| **ziyaret** | çûn dîtina yekî, em duh hatin ziyareta te lê tu ne li mal bû. |
| **zixrik** | kevirên biçûk, wek gozan û biçûktir |
| **zixur** | cihê newal û kûr û asê û bi kevir |
| **ziya** | ejderha, marê pir mezin. |
| **zîç** | zirç,zîrç, ziblê teyran |
| **zîk** | |
| **zîl** | serê zad, an giya ku nû bi dertê, zadê me zîl daye. |
| **zîlik** | perçê goştê tenik û sertûj ku di nav lêvên qûz de |
| **zîlo** | |
| **zîn** | yê ku didin ser pişta hespan û lê siwar dibin |
| **zînber** | qanî |
| **zînebo** | berzîn, ciwaniya du sal û nîvî ku hatiye ber zîn |
| **zînet** | xeml û xêz, zînetkirin, xemilandin |
| **zînî** | zînik, di çiyan de cihên ku wek sitoyê hêstirê her du alî bilind û nîvek wek zîn hinekî nizim. |
| **zîniya difin** | dawiya difin cihê ku hinekî nizm e |
| **zîp** | zîpikên ku di heft rojên gîskên pîrê de dibarin, zîp, ew tiştê ku mirov pêtê girêdan, wek gotin, şeref, camêrî. filan mirovekî bê zîp e. |
| **zîpik** | teyrak, zîrikê li zadê me da. |
| **zîr** | zîr |
| **zîrek** | zîrek, bîrbir |
| **zîro** | zîrû, zûrî, kûrmê aviyê xwînmij |
| **zîtik** | çifte, pînên ku bi şûn de davêjin. Hêstirê zîtik li min dan, hespê da zîtiken. |
| **zîv** | madenê gewrê ku jê pere û firaxên giranbiha çê dibin, bazinê zîvînî, kefçiyê zîvînî |
| **zîvar** | belengaz, feqîr |
| **zîvarî** | belenqazî, feqîrî |
| **zîvker** | keskê ku bi çêkirina tiştên zîvînî mijul dibe. |
| **zîvkerî** | karê zîvker, zîvkerî karê xelkê wanê ye. |
| **zîvirok** | dolapa ku di dor xwe re dizivire |

| | |
|---|---|
| **zîwan** | libên reş û bi dûvik ku di nava genim de şîn dibe. Zadê me bi zîwan e. Zîwan ji quzê hespê re jî tête gotin. |
| **ziwanî** | pisikên ser reş ku li ser çavên mirov tên |
| **zîx** | çik, şeng, çalak, filan peyakî zîx û jêhatî ye. |
| **zîz** | tenik, zirav, ne xurt. Filan peyakî dilziz e. |
| **zîzî** | tenikî, ziravî, qelsî, rebenî |
| **zîzik** | kesê zîz, dev ji wî berd e,Ew mirovekî zîzik e. |
| **zo** | cot, du fer yek, zo dû, zo û fer, zo bi zo hatin. |
| **zol** | perçê çerm ku têxin ser tiştekî û pê dirêj dikin. Qayişa min kin bû min zolek êxist ser. |
| **zoncî** | tijî bûna mistekê, zoncîk nok bide min. |
| **zonp** | zonpîn, dengê ketina tiştekî nerm û giran, min ew avêt erdê zonpîn lê hat an got zonp. |
| **zont** | çakûçê pir mezin ku pê keviran dişkênin |
| **zop** | kesê ku xwe bê fesal hişk û tîk digire. Hat li pêş min zop sekinî. |
| **zopzopî** | kesê ku dihenî halan de xwe zop digire |
| **zor** | xurt, pir zor lê kirin, min zora wî bir, di wî seri de em zor bûn, xurtbûn, zor baş e, zor spas. |
| **zorbe** | zorbaz, zalim, zînatkar |
| **zordestî** | neheqî, zilim kirin, ew zordestiyê li me dike, me zordestî lê nekir. |
| **zorker** | kesê ku zorê dike, zalim |
| **zorkerî** | zilim, zînat. Ev zorkerî nêkêşan. |
| **zotik** | zotik, civîneka devê qûnê di hûndir ve, zotika wÎ bi der gerî. |
| **zov** | kurmekî pir ling e, wek şemarê çil ling |
| **zozan** | sewzan, kohistan, havîngeh, .cihê ku havînê di çiyan de diçinê |
| **zû** | bi lez, zû here mal |
| **zûr** | |
| **zûrat** | celebek genimê misrî |
| **zûrrezûrr** | zûrîn, dengê sean gur ku dirêj dike, zûrrezûrra gûr e. |
| **zûrik** | roviya kor, zûrika wî qetî û pê mir. |
| **zûzik** | kesê ku her tiştî li xwe datîne û her kemiyê digire ser xwe |
| **zûzikî** | tesesî, pîsî, kemanî, ew nema dikare dev ji zûzikiya xwe berde. |

# FERHENGOKA HAWARÊ

| | |
|---|---|
| **a** | |
| **abadîn** | tişt an kesekî ko davî û paşiya wî nîne, naye, her gav dimîne, tucar winda û xirab nabe. hêyîne xwedê ebedîn e, ji ber ko xwedê herwekî ne zeve, namire jî. ehmedê xanî bi memozînê, navê xwe di dîrok" kurd û kurdistanê de abadîn kiriye. |
| **afirandin** | anîn pê, anîn wicûdê, xuliqandin. Xwedê erd û ezman û mirov afirandin. xwedê afirandin ji bo wî felek ji bo xidmeta wî şihandin melek. |
| | Ehmedê Xanî |
| **agah** | xeberdar, serwext. Ez agah bûm, ez xeberdar bûm. |
| **armanc** | her tiştê ko ji bona avêtina nîsanê têt daci kandin. paşiya tiştê ko çavê mirov lê ye û dixwaze xwe bigehîne wî. berikê wî li armancê ne ket, armanca hawarê peşvexistina zmanê kurdî ye. |
| **awarte** | yê ko nakeve bin hikmê qeyda gelemper û jê tête awartin. Vê qeydê tu awarte nîne. bi awerteyî destûra wî dan. Awarte tu qeyde nayînin pê. [Exceptionl |
| **azîn** | awayê tevayiya zanînekê an tişte kî. |
| **azîna elfabê** | yanî tevayiya qeyde û destûrên ilma elfabê. berdêlka wê di zmanê elmanî de "lehre" ye. |
| **b** | |
| **babelîsk** | tevayiya sed salî, sedsalek babelîskek e. |
| **belg** | ji belgên daran pêve ji cil û girêdanê re jî têt gotin |
| **bendewar** | pêgirêdayî: Heçî kurd hene hemî jî kurdên iraqê ve bendewar in. |
| **berbêjî** | qewimîna tiştekî berî ko biqewime dibêjit |
| **berbînî** | dîtina tiştekî berî ko bête pê. Berbîniye wî ne çû serî, yanî di heqê filan tistÎ de digot holê an welê dê çêbibit lê çenebû. |
| **berbîn** | ewê ko berî çêbûne dibîne. |
| **berhevdan** | ser tiştekî, ji bona diltijîkirina hevdu ştexalî û sehîtî kirin.Bi saetan ve me da ber hev lê dîseri me dilê yek tijî ne kir. |
| **Berpê-bûn** | hatin pê. ji serxwebûna welatekî re xebateke mezin divêt, serxwe bûn bê xebat û fedakariyê berpê nabe. naye pê. |

| | |
|---|---|
| **berpêşkî** | yê ko beriya esas û bingeh têt û wan bi ronî dike û sehkirina wan pê hêsanî dibe.Rêmanên berpêşkî, qeydeyên berpêşkî. [prêliminaire) |
| **bihemd** | heçî ko ne bêhemd e |
| **bijîşk** | ewê ko bijîşkî dike. bi xweşkirina jiyîna mirovan mijûl dibe û wan derman dike. |
| **bingeh** | hîm û eslê tiştekî herçend zmanê kurdî û farisî di kitkitên xwe de ji hev vediqetin lê di bingehî de digehin hev |
| **binyan** | ji her texlît avahiyê re binyan têt gotin. xanî, burc, kesr, olî, mizgeft h.p. |
| **biyanî** | herçî ko ne ji wî eslî ye ko çêl lê dikin, yanî qala wî dikin. Kurdmancin hene li şûna [biyanî] lxerîbl dibêjin. Xerîb pirseke erebî ye. Biyanî, xwerû kurdmancî ye. Xelkê welatê jêrîn jê re [bîqanel dibêjin. |
| **bîrawer** | tiştê ko hêja ye di bîran de bimîne û naye ji bîr kirin. Sala 1925an ji bo kurdan tarîxeke bîrawer e. (mêmorable) |
| **boş** | zehf, gelek. Li ser welêt baraneke boş hat. |
| **bûyer** | (m)-her tiştê ko di dinyayê de tête pê. Ev bûyereke girane ye. (Êvênernant) |
| **cenkeştî** | (m) - herçî kêştiyên ko ji bona şer hatine çêkirin. gir û hûrên wan hene. wek torpiyor, bertorpiyor, krewzor, dretnewt. ( batiment de guerre ) |
| **cihderk** | cihê derketinê, kaniya tiştekî. cihderka (b) lêv in, yanî dengê herfa (b) ji lêvan derdikeve. |
| **civakî** | yê civatê re girêdayî, xwe digehîne civatê, rêzikên civakî, qanonên civakî, yanî ew rêzik û qanonên ko jiyîna me a civakî digerînin |
| **ciyok** | pirsên ko mana wan nîzingî hev an wekhev in wek rêkirin û şandin. |
| | ç |
| **çand** | ev pirseke gelek mihim e. divêt xwendevanên me qenc bala xwe bidin û di ser zmanê xwe re bêxin. ji ber ko ev pirsa ha ne di zmanê me de ne jî di zmanên cînar de jî heye. ereban jî vê paşiyê xistine zmanê xwe. ji tevayiya ilm û hiner û pîşeyên spehî re çand têtê gotin me ev pirs ji çandinê girt. ji xwe di her zmanî de jî welê ye. ji ber ko herwekî ceh û genim bi erdê têne wer kirin, ilm û pîşe jî bi ser û mejiyê mirov têne wer kirin, çandin. |

| | |
|---|---|
| **çanda ewrûpayî** | tevayî û awayê zanîna xelkê ewrûpayê. em dikarin çanda kurdan jî bibêjin. pê dîrok, çîrok, stran, dîlan, medhelûk, mamik û herçî rêzik û adetên me hene têne zanîn. |
| **cejn** | şahînet. reşahî, îd. cejna te pêrûz be. |
| **d** | |
| **dehker** | rastiya tiştekî ko bi temamî û ji binî ne nas e û carinan veşartî ye ji gotina xelkî re guh mede dehkera meselê ez dizanim. |
| **dengayî** | pîşeya dengan, pê tevayiya dengên zmanekî tête seh û nîşan kirin. |
| **dengê paşkî** | ew dengê ko ji paşiya dev derdikeve |
| **dengê pêşkî** | ew dengê ko ji pêşiya dev derdikeve |
| **dengî** | bi deng re qirêdayî, pê bendewar |
| **dengînî** | tevayî û halê "dengî ", herf carkê bi şiklên xwe, carkê bi dengîniya xwe têne seh kirin |
| **destrêj** | pirseke kevn e. wekê çekên me tîr û kevan bûn û di şerî de kevankeşan kevanên xwe bi hev re dikişandin û tîrên xwe berdidan jê re destrêj dihate gotin |
| **dibistan** | ew dera ko tê de hîn dikin. di dibistana gundê me de deh zaro hene. |
| **dilevra** | dilê wî bilind û pak, çavtêr û mihirban, alîcenab. |
| **dişwar** | ne hêsanî, zehmet.<br>Dişwar e gelek belayê xurbet,<br>Binve, kezeba min binve lo lo'<br>Emin alî bedirxan |
| **dîl** | ne aza, girtî, hesîr. dilê dîlen te me îşev mêvanê te me sibe ser rêka xwe me |
| **dîlbend** | ewê ko bi du an çend zmanan dizane, û pirsên zmanekî bi pirsên zmankî din dide zanîn, dilbend e. dîlbendê me her çend bi kurdmancî rind dizane lê frensiziya wî hinik kêm e. |
| **dîlbendî** | karê dîlbendan. filan kes lîbendiyê dike, yanî dîlbend e. |
| **dîrok** | pêşiya tiştekî an mirovekî. dîroka dinyayê gelek kevn e. dîroka jîna selahedîn bi serê xwe dinyayek e. |
| **dotmîr** | keça mîr. di rêzika kurdistanê de herçî torin û makul gora rêzên xwe dihatin bi nav kirin. wekî niho mîr, mîrek, pismîr, dotmîr, bêmîr, jinmîr. axa, pisaxa h.p. |
| **doz** | dehwa û daxwaz, paşiya daxwazê |

| | |
|---|---|
| | Xwelî li ser te dikim,<br>Dest bi deng û ceng dikim.<br>Doza şeng û peng dikim.<br>Dehwa şerîet dikim. |
| **duta** | ta bi xwe qat e. |
| **duta** | duqat. xanîkî dutayîn. xanîkî bi du qatan |
| **dûpaş** | (n) birê bêjeyê ê guhêrbar. di bêjeya "ketin" de du bir hene "ket" û "in" "ket" rayek û "in" dûpaş e; û ev dikeve şikiline din û diguhêre ez ketim, tu ketî, ew ketin. (terminaison) |
| **e** | |
| **ejnû** | çok, kab. kurdmancin hene wek frensizan jê re (jinû) dibêjin. |
| **erdnigarî** | ilma ko bi her awayî wesfa erd û dinyayê dide; çiya, çem, deşt, bajar, tendûrek, gol, newal h.p. erdnigariya kurdistanê. |
| **f** | |
| **fekrandin** | nihêrtin, meyizandin. fedkire binihêre. |
| **ferhengok** | ferheng komela tevayiya pirsên zmanekî ye. ferhengok ferhengeke kiçik e ko tê de pirsinen wî zmanî peyda dibin. ferhenga kurdî, ferhengoka hawarê |
| **folklor** | (m)- ev bêje di eslê xwe de ingilîzî ye. lê îro ketiye hemî zmanên dinyayê. ji lewre me jî ew xistiye zmanê xwe. ji xwe kurdên qefqasê beriya me ev bêje xistine zmanê me û kitêbek bi navê "folklora kurdmancî" belav kirine. folklor tevayiya adet, çîrok û stranên miletekî ye. ew adet, çîrok û stranên ko ji nav xelkê bi derketine û di dora nifşan de bi ser ve ketine û gihaştine nifşên nû. ji xwe bêjeya folklorê bêjeke bihevketî ye û bi mana zanîn an zanistiya xelkê ye. (folklore) |
| **g** | |
| **gelemper** | tiştê ko ne xweser e, ji bo her kesî an ji bo her tiştî ye. qanûna mirinê qanûneke gelemper e; tu kes jê nafilite. bi gelemperî; bi awayê gelemper. bi gelemperî kurdmanc çiyayî ne. [qênêrat] |
| **geşî** | halê geşbûnê. geş, ew tişt e ko bi ruhnahi ye, bel û vekirî ye.<br>Bihnûniya dewleta te geş bit,<br>Qasî tu hebî dilê te xweş bit.<br>Emin alî bedirxan |
| **gewherîn** | ji gewherî çêkirî, wek gewher. |

| | |
|---|---|
| **guhêrbar** | tiştê ko di hal û şikilekî de namîne, diguhêre û dikare biguhêre. ev bêje guhêrbar e. yanî şikilê wî diguhêre û di halekî de namîne. herwekî bêjeya "bajar." ez ji bajêr têm. tu vî bajarî dibînî. ez van bajaran dibînim. [variable] |
| **guwah** | ewê ko tiştek dît an bihîstiye, û piştre awayê çêbûna wî gora dîtin an bihîstina xwe dide zanîn. |
| **gûmik** | seriyên tiliyan, nermikên tiliyan. |
| **h** | |
| **havîna pêşîn** | meha salê a çaran. ji xwe kurdmanc mehan bi du awan bi nav dikin. bi navên ser xwe û bi navên çaxên salê.<br>1.Adar [Bihara pêşîn]<br>2.Nîsan [Bihara navîn]<br>3.Gulan [Bihara paşîn]<br>4.Hizêran [Havîna pêşîn]<br>5.Tîrmeh [Havîna navîn]<br>6.Tebax [Havîna paşîn]<br>7.Îlon [Payîza pêşîn]<br>8.Çiriya berî [Payîza navîn]<br>9.Çiriya paşî [Payîza paşîn]<br>10.Çileya berî , kanuna berî [Zivistana pêşîn]<br>11.Çileya paşî , kanuna paşî [Zivistana navîn]<br>12.Sibat , gecko [Zivistana paşîn] |
| **hepo** | şehê hesinîn, pê girên mehfûran tên şidandin. |
| **hevok** | [m] ji her birê komekê re hevok dibêjin. komek carina jî ji hevokeke bi tenê tête pê. di her komekê de herçend lêker hene ewçend jî hevok peyda dibin. komekine bi yek hevokê derew sêwî ye. baran dibare. gurqîn çû welêt. komekine bi çend hevokan ez bawer dikim; ko xwedê heye. [proposition] |
| **hevol** | ol ew tişt e ko mirov pê ewle û bawer e. ola zerdeşt, ola mûsa. perîcar em jê re diyanet dibêjin. |
| **heval** | yên ko ji olekê ne. |
| **heyber** | [n]-her tiştê ko xwediyê heyînekê ye; rihber, ne rihber. heyberên tebîetê. (objet, être) |
| **heyîn** | halê hebûnê. heyîna xwedê ji mêj ve ye û abadîn e. |

| | |
|---|---|
| **hêman** | [n]-esas an rikinên heyînekê. ew tev de heyînekê ditînin pê, lê bi xwe ji hev de nakevin; yanî ew heyberîne sade ne û ne hevedidanî ne. pêşiyan digot hêmanên tebîetê çar in ax, av, agir û hewa. [êlêment] |
| **hêsanî** | ne dişwar. ji bona herkesî zimanê wî hêsanî ye, ne dişwar e. |
| **hingûr** | piştî êvarê, destpêka şevê . şeva terî ji hungirê kifş e.' |
| **j** | |
| **jînenigarî** | awayê jiyanê û tevayiya biserhatiyên mirovekî jînenigariya wî ye. |
| **k** | |
| **kamiran** | yê ko kama xwe dirane, pêş ve dajo. kam bi xwe miraz e. |
| **kat** | di kitêba zerdeşt de lajê an stranin hene. ji wan re kat têt gotin. katên zerdeşt. |
| **keştî** | [m]- jê re bi hin ferqan gemî û vapor jî dibêjin. keştî xwerû kurdmancî ye. |
| **keştîvan** | peyayên ko di keştiyê de dixebitin û wê bi rê dixin; mîna kelekvan. [bateau] |
| **kevandin** | mîna kevanê tewandin û li erdê xistin. |
| **kevnar** | kevnar her tiştê kevn, lê ewçend kevn ko dema çêkirin û danîna wî ji me dûr e, ji me re ne nas e, di zemanê pêşiyan de çêbûyî, ne nûjen. |
| **kotekî** | tiştekî bêhemd, bi zorê, bivê nevê. ez ne diçûm, kotekî ez birim. |
| **kutakirin** | xelas kirin, qedandin. me dersa xwe kuta kir. dersa me kuta bû. |
| **kûvan** | êş, kul, keser.<br>Sed ah û kûvan û keser,<br>Heft eyn û lam çûn hicretê.<br>Feqehê teyran |
| **l** | |
| **lavelav** | ji levayiyê têt, li ber geriyan. lavayî kirin. wekê mirov ji xwedê lavayî dike û daxwaza xwe jê re dibêje ji wê daxwazê re [lavelav] tête gotin |
| **liservebûn** | naskirin, karin bi nav û nîşan kirin, ji hev derêxistin. bijîşk li ser nexweşiya min venebû, yanî nikari bî bizane ez ji çî têşihim, nexweşiya min çi ye. ez carkê hatibûm vê derê, lê niho liservenabim. bijîşk bi ser nexweşiya min venebû. |
| **m** | |

| | |
|---|---|
| **med** | miletekî kevn e. miletekî arînijad e. med medeniyeteke mezin anîne pê. kurd ji medan dahatine, kurd zarowên medan in. |
| **mehdik** | xelkê botan dibêjin. kurdmancin hene jê re landik, hinên din dergûş dibêjin. |
| **mêvanxane** | xaniyê ko mêvan û rêwiyan bi pere dihewînin. wek odeyên gundên kurdmancî. lê bi vê ferqa ko odeyên me herwe ne, mêvanxane bi pere ne. bi frensizî [otel] dibêjin. |
| **Mijar** | [m]- tiştê ko esasê nivîsandin an axaftinê ye. mijara hawarê a bingehîn zmanê kurdmancî û pêşveçûna wî zmanî ye. mijara vê kitêbê şerên kurdistanê ye; yanî tê de qala şerên kurdistanê dikin. [sujet] |
| **mivro** | mirovê netevav, tiştekî wî kêm [nîv mirov] her wekî kor û kulek. |
| **n** | |
| **nependî** | cihê ko kes lê nîne, ne sêpila xelkê ye. ji pandinê têt, cihê ko ne pandî ye, lê napên. nepenî jî têne gotin. |
| **neyîn** | halê nebûnê. heyîn û neyîna wan wek hev in. ji heyînê ketiye neyînê. |
| **nêrevan** | [n] yê ko guhdariya tiştekî dike, lê kûr dinêre û bala xwe dide; nêrevaniyê dike. nêrevanên siyasî, balafirên nêrevaniyê. [observateur] |
| **nifş** | çêliyên zemanekî û zikekî. |
| **nijad** | tevayiya pêşî û paşiyên mal û miletekî. her milet vedigere nijadekî û çend milet di nijadekî de digehin hev. herwekî kurd û ecem ji nijadekî, ji reyekî ne. her du jî ji nijadê arî ne. |
| **niktezan** | niktebêj, ewê ko nikteyan dizane û dibêje. filan kes niktezan e. behvan niktebêj e, nikteyan dibêje. |
| **nikte** | ew gotin e ko mana wê ji bona herkesî ne kifş e. têgehiştina wê hinek diswar e. bi awakî welê lihevhatiye ko mana wê yekcar rast mebe jî dîsan kêfa mirov jê re têt. ji xwe spehîtiya wê jî di wê de ye. herwekî xwendevanên me dizanin navbera Şêxê Barzan û hikûmeta Iraqê şer e. kurdên Barzan vê paşiyê çend balafirên Iraqê daxistine. di nav zabitên balafiran de ingilîz jî iraqî jî hebûn. barzan Iraqî kuştin û dest bi ingilîzan ne dan. xelkî ji Şêxê Barzan pirsîn te çire iraqî kuştin û ingilîz hiştin, iraqî misilman, ingilîz file ne; diviya bû tu ingilîzan bikujî û iraqiyan hilînî, şêxê ciwan û niktezan li wan vegerand û got min jî lewma kuştin. ji ber ko ez naxwazim xirabî li xelkî bikim. min misilman kuştin, ew bûne şehîd û bi destê min çûne bihuştê, min ingilîz bikuştana, ji lewre ko file ne bicûwana dojehê. |

| | |
|---|---|
| **nimînende** | evê ko heyînek an heyîna tiştekî dinimîne, raber dike. |
| | nivîsanok bi du manan e; tevayiya nivîsevanên rûjname an kovarekê, koma nivîsevanan. hevind ji nivîsanoka hawarê ye, yanî ji koma nivîsevanên wê ye. |
| **noqar** | (m)- keştiya ko noqî avê dibe û di bin avê re diçe. noqar cenkeştiyek e, tê de top û torpîl hene. Dûrebineke wê heye ko di ser avê re dimîne. kumandarê noqarê pê guhdariya keştiyên dijmin dike û gava ew wan dibîne noqar dertêt rûyê avê û li wan dixe. (sous marin) |
| **nûçe** | (m)- itiştê ko ji nû ve qewimiye. nûçeyên şer, nûçeke derewîn, li gora nûçeyên radyowê di şeşê nîsanê de elmanan drêjî yewnanistan û yûgoslavyayê kirine. (nouvelle) |
| **nûjen** | nûjen, herçî ko ji nû ve hatiye çêkirin, çaxa çekirin u danîna wî ji me ne dur e, ji me re nas e. ne kevnar. 328 |
| **p** | |
| **parîz** | bexçeyê bihnûn û kulîlkan, xemilandî û lêkdavî. bi frensizî jê re (park) têtê gotin. |
| **paşkî** | her tiştê ko ji paşiyê ye. |
| **parkît** | (m)- kîta ko dikeve paşiya bêjeyekê û mana wê diedilîne. (xew- xewar. Mêr- mêranî, mal- maldar) di bêjeyên (xew,-ar, mêranî, mal-dari de [ar, anî, dar) parkît in. [suffixel |
| **pejirandin** | ji tiştekî re ko têt dayîn an gotin herê kirin û pe ve çûn, qebûl kirin. |
| **pend** | şîret e. pendên ayîna kurdaniyê. ew pendên ko mirov di ayîn û xebata kurdaniyê de divêt pêve biçit, kar û xebata xwe li gora wan saz bikit. |
| **pêrkît** | (m)- kîta ko dikeve pêşiya bêjeyekê û mana wê diedilîne. (bûn- vebûn, kirin- rakirin, anîn- hilanîn) di bêjeyên [vebûn, rakirin, hilanîn] de vera. hil" pêrkît in. (prefixe) |
| **pêşkî** | her tişte ko ji pêsiyê ye. |
| **pispor** | pispor mirovê zana ko zanahiya xwe di zanîneke de kûr xistiye, le hûr nihertiye û di kitkitên we gihaştiye. |
| **pronivîs** | her tişte pêkhatî, nivîsandî nenivîsandî, ko awa u rêveçûna xebat û karekî nîşan dide, û berî destpêkirinê têt çekirin: me pronivîsa xebata xwe pêkeni, êdin divêt ko em dest bi xebata xwe bikin. |
| **q** | |
| **qebalewî** | bi qebale, û gora dilxewaz an lihevhatinê cêkirî, ne kotekî |
| **qelemrew** | tevayiya erd u welatên ko di bin deste dewleteke de ne. |

| | |
|---|---|
| **r** | |
| **raman** | dan serê xwe. fikirîn jî tête gotin, le ev ne bi kurdmancî ye. Raman kurdmanciyeke xwerû ye, lê di nav kurdmancan de kêm bûye. ji ber ko zû ve ye me dev ji ramanê berdaye. ma em qet diramin û didin sere xwe gelo halê me dê bibe çu? |
| **ravekirin** | 1. ji bînî ji rayî vekirin û dan zanîn. 2. ji rayî vekirin, pês çavan xistin û dan zanîn; îzah kirin. |
| **rawes** | (m)- hale rawestan û sekinîne. tiştê destpêkirî qut kirin û sekinîn. ev der cihê rawesê ye. 329 |
| **rayek** | (n)- birê bêjeyê ê neguhêrbar. di bêjeya "ketin" de "ket" rayek e û tucaran naguhêre. ez ketim, ew dê bi-ke-ta, ez ket-i- biwam ew ket-i bû. (ra-dicale) |
| **rehakar** | ewê ko rehayê, xweşiyê dide. |
| **rêman** | [m] fikra ko me der heqê tiştekî heye. tu rêmana mêraniyê di wî de nîne. (notion) |
| **S** | |
| **serpilkî** | ne ji binî, ji rû û ser, ji derve û dûr. ez filan kesî serpilkî nas dikim, yanî navbera me de nasî hebe jî ne ewçend kûr e, ez wî nas dikim lê nizanin çi mirov e, qenc e. xirab e. |
| **ş** | |
| **şandiyar** | [n] mirovê ko ji stasyoneke radyowê nûçeyan û tiştine din diweşîne û belav dike. di radyowa rohelat de şandiyarê kurdî li heftê du caran bi kurdmancî diweşîne.( speakert.emetteur). |
| **t** | |
| **tar û po** | benên tevnê yên drêjahî û pehnahî. |
| **têgehiştin** | qenc fehm kirin û berketin. herçend tu bibêjî jî ew tênagehişt. |
| **têvel** | ne ji yek cins û celebî, ji cinsine ji hev cida û biferq, ne weke hev. ordiwa ingilîzan ji eskerine têvel bihevketî ye. [diffêrent) |
| **tîp** | şikl, texlît, niminendeyê şiklekî. tîpê her miletî cihe ye. tîpê kurdan ji tîpên din bi hin wesfan tête veqetandin. tîp û (pit) welê dimîne ko ji yek rayî ne. pit, bi mana kîçikê her tiştî ye. piçik pitik, piçkok, pitek h.p. kurdmanc wekê banî jinên xwe dikin dibêjin [pitê) yanî kiçikê, spehyokê. dîsan heye ko [pit] û pirsa frensezî [petit) ji hev ne cuda ne. |
| **tol** | evd. evdîn, heyf. |
| **v** | |

| | |
|---|---|
| **vejandin** | ji mirinê anîn jiyînê. ji nû ve jiyîn dayîn. şerha xemidil bikim fesane, zînê û memî dikim behane. nexmê we ji perdeyê derînim,<br>zînê û memî ji mû vejînin, Ehmedê Xanî. 330 |
| **vekît** | [m]- awa û şikilê nivîsa nd i na bêjeyan û terzê bihevebûna wan. vekîta gurgîn qenc e yanî gava dinivîsîne xeletan nake û her bêjeyê weke xwe û rast din ivîsîne. ez vekîta vê bêjeyê nizanim; yanî ez nizanim ev bêje çawan tête nivîsa ndin. [dictêe) |
| **vekîtandin** | ji yekî re ti ştek xwendin an gotin û ew tişt jê re dan nivîsandin. tu ji min re vekîtlne ezê binivîsînim. [dicter) |
| **vên** | bi tevayiya xurtiya dilê xwe xwestin û li ser sekinîn, pê biqerar bûn. rehmetî xanî dibêjit: sifatên di seb'e ji bo zilcela<br>bizan heft in ey arifê pur kemal;<br>xweşi, şîn û zanîn û vên û kelam<br>bihîstin digel dîtî bû temam. |
| **vêsih** | (m) di halekî de mayîn û tê de ji rawesê kêmtir sekinîn. te di vê vêsihê de dirêj kir. (pose) |
| **vêsihandin** | rahet kirin. xwe vêsihandin, xwe rahet kirin e |
| **w** | |
| **weşînek** | [mj- karê belavkiri nê, herwekî di radyowê de. weşîneka kurdî nîv saet dom dike, di vê wesînekê de şandiyar nûçeyên dinyaye dide zanîn û pişt re dest bi pronivîsa stranê dike û çend qewanên kurdmancî digerîne [emission) |
| **x** | |
| **xeberdox** | ewê ko bi nav û navê çendekên din, ber hemiyan ve dibêje. |
| **xeberdoxî** | xeberdox-bûn e. |
| **xwenda** | her kesê ko xwendin û nivîsandinê dizane xwenda ye. |
| **xwendewar** | iw kesê ko gelek xwendiye û di vî warî de xwedan behre bûye. |
| **y** | |
| **yekbûn** | yekbûn jî wek yekitî ye. lê di yek bûnê de ew tiştên an kesên ko hatine lihevanîn an dayîn hev, dibe ko ne ji yek rayi bibin û rûjkê ji hev vebin û veqetin. |

| | |
|---|---|
| **yekitî** | yekîtî, pêk û lihevanîna kitkitên tiştekî ko di hîm û bingehên xwe de ji yek rayî ne, ne cuda ne. ko bi yekîtiyê digehin hev û bi tevayî heyînek ditînin pê, û êdin ji hev venaqetin. 331 |
| **z** | |
| **zar** | zman, birê zmanekî. di zmanê kurdî de sê zar hene. zarê dumilî, zarê lorî û zarê kurdmancî. |
| **zarawa** | di nav yek zarî de awayên gotinê û bilêvkirinê. |
| **zendavesta** | vek her pêxember Zerdeşt jî xwedan kitêb bû. zendavesta navê kitêba wî ye. |
| **zendî** | zmanekî kevn e. zmanê me, zmanê kurdî jê hatiye girtin, yanî eslê zmanê me zendî ye. Zenda vesta bi zmanê zendî hatiye nivîsandin. |
| **zerdeşt** | berê kurd zerdeştî bûn. zerdeşt pêxemberê wan bû. Ehmedê Xanî ko pê dizanî bû, di [zîno-mem) de bi beyta jêrîn ve li zerdeştbûna kurdan işaret dikit û dibêjit malê xwe ji rengê qewmi- zerdeşt da agir û gaziya xwe rahişt. Ehmedê Xanî |
| **zmanazîn** | tevayiya qeydeyên zmanekî zirnazîna wî zrnanî ye. |
| **zîvarî** | belengaziya mirovên mezin û dewlemend. |
| **zûbîrbirî** | xurtiya zû bîrbirinê, filan zûbîrbir e, zû bîr dibe, têdigehe, dizû bîrbiriyê de xurt e. 332 |

# FERHENGA

# KAMÊRAN SILÊMAN BOTÎ

# FERHENGA KAMÊRAN

kurdî- kurdî

Weşanxaneya Spîrêz

2006

https://zanistvan.wordpress.com/

# FERHENGA KAMÊRAN

## kurdî- kurdî


## Kamêran Silêman Botî



## Weşanxaneya Spîrêz

## 2006

# A

| | |
|---|---|
| **a** | 1.pîta êkê ji abeyê. 2.bersivdana eyînî[erênî] anku belê. erê.3. dema axivtinek ne ron bit û mirov bixazit bihêt dubarekirin. ş. gavan yan xwedî çevrî, gare( (çêl û ga) jibo hawi(kirin, serrêkirin yan vegerandina çêlekan dibêjin.: a were çêlê!. |
| **abad** | (n,kevin.nêr) ***kevin*** avayî. |
| **abdar** | (n.x.nêr) hesp. |
| **a be** | rêzkirina pîtêd kurdî ji a ta z .zanîna rêzkirina pîtan : abêya kurdi ji 31 pitan pêk di hêt. |
| **abone** | (n.x.mê) parek vebirî û bêkute mirov di dit partî yan dezgehekî ko endamê wê bit.:aboneya mehane, aboneya sanale û htd. |
| **abonedan** | (k.jn.l.mê) weke endamek aboneyan di de. : ez mehane 10 dînar abone di dim dezgehê. :heger aboneyê ne dî nikarî bibî endam. (k) bn: dan. |
| **abor** | ( n.x.mê) destgirtin. |
| **abori** | (n.x.mê) 1.destgijrtin, kêm mezaxtin 2. ti(tê têkilî bi kirî û firotinê ve hebit. |
| **aborînas** | ( n.l.dz) bn: abrîzan. |
| **aborîvan** | (ndar.dz) bn : aborîzan. |
| **aborîzan** | (n..l.dz) mirovê pispor û (areza di ware aborî da. |
| **aborkirin** | (k.jn.l.mê) aborî têda kirin. kêm mezaxtin. destgirtin. (di vêt em aborîyê[aborê] di pareyê xweda bi kin, dako bi karin xanîyê xwe ava bi kin. (k) bn: kirin. |
| **adar** | ( n.x.mê) meha êkê ji biharê, serê sala kurdi. ***pend*** :adarê me(ik li darê ne li vêrê li beriya (ingarê. ***pend*** :avdar naçit bê gul. |
| **ade** | (n.x.mê) paqijkirina çandininê ji gîyayên bê mifa. |
| **adekirin** | (k.jn.l.mê) jinavbirin û derînana gîyayê bi ziyan ji nav çandinê. : rezê xwe ade kir. baxî ade bi ke. (k) bn: kirin. |
| **adekirî** | (hk.l.çewa) zevî, çem yan baxê ji gîyayê ziyandar hatî baqijkirin. :zevîya adekirî. ev reze yê adekirî ye. |
| **adem** | (n.x.nêr) ékemîn babkalkê mirovan. adem û hewa. |
| **ademzad** | (n.dar.dz) mirov. meriv. |
| **adî** | (n,x,nêr, hn.x.çewa), 1.giyandarên biçûk yên jehirdar wek dûpi(k, zîvzîve,tevipîrk,…htd. :adîyekî yê pêveday. 2. dirinde. |
| **ADK** | (kurtkir) ajansa dengubasên kurdistanê.dezgeha ragehandin û belavkirinê li kurdistanê. |
| **adodik** | (n.dar.mê) hesinek dev zirav û tîje bi destikekê darî ve kirîye jibo derînan kengir û serikên gîyayên xwarinê. hadûd. |
| **afat** | (n.x.mê) derd, kovan, nexwe(î.: afatek dê bi serî hêt çunkî mirovekê ne hecimtîye. |
| **aferin**, pesin dan , aferin | (alv.pesindan) destxwe(i , keyf pê hatin, tu di xandkna xweda serkefti. |

| | |
|---|---|
| **afirander** | (n.dar.dz) kesê afirandinê diket. |
| **afirandi** | (hk.dar.çewa) hatîye afirandin. |
| **afirandin** | (k.jn.x.mê) ti(tê nû çêkirin. hizirên nû peydakirin.avrandin.(k) bdn: ez di afirînim em di afirînîn, tu di afirînî hûn di afirînin, ew di afirînit[…ne] ewan di afirînin. pr: dê[bi] + bdn. bdb : di afirand, di afirandin. db,dûr :afirandibû. ….bûn.(f) : bi afirîne, bi afirînin. |
| **afret** | (n x, m) niv(ê mê , jin. pîrek. kulfet. |
| **afrîka** | (hk.cih.cugrn) kî(wera afrîka. welatên afrîka. |
| **afrîkayî** | (nej,n.dar.dz) mirovê ji afrîka. |
| **afrîkî** | (n.nej,n.dar.dz) 1. mitayê ji afrîka. 2. mirovê afrîkayî. |
| **agah** | (n.x.mê) ageh. |
| **agahbûn** | (k.jn.l.mê) hi(yarbûn. agehbûn. (k) bn: bûn. |
| **agahdar** | (hn.dar.çewa) agehdar. |
| **agahdarbûn** | (k.jn.gl.mê) agehdarbûn. (k) bn: bûn. |
| **agahdarî** | (n.dar.mê) agehdadrî. |
| **agahdarkirin** | (k.jn.gl.mê) agehdarkirin. :berî tu herî navendê min agahdar bi ke!. (k) bn: kirin. |
| **Befirmalîn** | (k.jn.I.mê) Havêtina befirê ji ser ban û kolanan.: Te befira banî malî?.(K) bn : Malîn. |
| **Beg** | (n.x.dz) Rûspî. Mezin. Axa, ê binemalê yan hozê. |
| **Begî** | ( begê) (n.x.mê) Navê jinane ji beg hatîye. |
| **Begzade** | (malb,n.dz) Nivişê began. Malbeg. Malmezin. Pend:Begzade kurore lê bûne kade. |
| **Behane** | (n.x.mê) Dema mirovî divêt karekî ji xwe ra rewa bibîne û berevajî, mirov dê li hêcetan gerit. Pelîka.:Wî ji xwe ra behanek dît ko bi karit destûrîyê ji mamostayê xwe bisitînit. Rê. :Şerha xema dil bikim behane, Zînê ii memo bikim behane.(h;A.Xanî) |
| **Behdînan** | (cugraf,n.x) Devereke li Kurdistana Iraqê.Parêzgeha Duhok, Musil. Zaxo Akrê û htd. |
| **Behdînî** | (malbn.dar) 1. Xelkê devera behdînan. 2.Devoka xelikê Badînan pê dipeyvin. Zarê behdînan. 3. Dînê pîroz (zerdeşti). Ola zerdeştî. |
| **Beheşt** | (n.x.mê) Mala xodê ya xweş û dilveker, ko cihê çakan û xodênasan. Pend : Beheşta ker û golik lê bi çerîndojehe.. :Xudê cihê wî bi kete beheşt. Hîvîdarim tu biçî beheştê. : Kurdistana wekî beheştê ye. Ang; cihek herçend yê xweş li ciwan bit, heger mirovên ne rind lê hebin dê bite dojeh. Brx Dojeh. |
| **Beheştî** | (hn.dar.çewa) Mirovê çak xweşdivî, ko xelik hertim daxaza beheştê jêra di kin.: Ew mirovek hind, hêjaye beheştîye. |
| **Beheştok** | (n.dar.mê) Giyayekê kûvîye, gula wî sipî û nîva wê zere..: Mirov pê dilîzin, dema perên gulê dikişîn ;di bêjin beheşt , ya dû re dojeh, yan ez divêm , ez nevêm. Evca kanê dê perê dawîyî (beheşt, dojeh, viyan yan ne viyan) be. Babirc. |
| **Behitî** | (hn.x.çewa) Mirovê behitî; ango mirovê pir tirsonek ji tirsan da reng zer û pêtî di bit, yan ji egera mizgînîyeka nexweş pêtî di bit. :Eve çi zelamekê behitî ye!. |
| **Behitîn** | (k.jn.x.mê) Reng zerbiin ji tirsan, birsan û nesaxîyan. Pêtîbûn.(K) bdn: ez di behitim em di behitîn, tu di behitî hûn di behitin, ew di behite[...it] ewan di |

| | |
|---|---|
| | behitin. Pr: dê bi + bdn. Bdb : ez di behitîm em di behitîn, tu di behitî, hûn di behitîn, ew di behitî ewan di behitîn. Db,dûr : ez behitîbiim, em bihitîbûyn, tu behitîbtiy hûn behitîbiin, ew behitîbû ewan bihitîbiin. (F) : bi behite, bi behitin. |
| **Behî** | (n.x.mê) Danana civatan ji alîyê mirovên mirî ve û xelik di hên serexoşîyê li wan di ken ti nizaya beheştê ji mirîyê wan ra di kin. Şînî. |
| **Behîçin** | (n.I.dn) Mirovên di çin behîya xwedîyê mirî. : Evro gelek behîçin ji gundî hatin behîya me. |
| **Behîdanan** | (k.jn.I.mê) Dema xudanên mirî behîyê li mal yan mizgeftan di danin ji xelik bi hên sersaxîya wan bi xwazin. : Erê behîya . . . . Li kîrê ye?. |
| **Behîdar** | (n.dar.dz) Kesên di hên behîyê. Pişikdarên ehîyê. Behîçin. |
| **Behîn** | (k.jn.x.mê) Giya li werzê payîzê reng zer di bit.genin û ceh behîn dema dirûnane. :Li meha xizîranê pîş di behit .Seridîn. Giyayê aqarî behî. |
| **Behît** | (hn.x.çewa) Mirovê bizdihayî.Behitî. : Eve te çîye tu yê behît ?. |
| **Behîtman** | (k.jn.I.mê) Behitîn. (K) bn: Man. |
| **Behre** | (n.x.mê) Bar. Pişk. Par. : Te çi behre di malê da nîne. Behra pitir jibo birayê mezine. |
| **Behredar** | (kara.dar.dn) Pişkdar. |
| **Behredarî** | (n.dar.mê) Pişdarî. |
| **Behredarîkirin** | (k.jn.gl.mê) Pişkdarîkirin. (K) bn :Kirin. |
| **Behremend** | (hn.dar.çewa) Xwedî şiyan. Xwedî hizir. Hizirvan. |
| **Behzad** | (n.l.nêr) 1. Kurê ji malan ,resen. Nivşê baş.2. Navê kurane. |
| **Bejin** | (n.x.mê) Pêkhatina leşê morovî .Qed û navteng. Bala. :Bejina wê mîna tayê darê ye.Pend :Bejin ê çi di dirînî, ziko çi di xoy.ang; jibo kesê zengîn ii her tişt liber destan. |
| **Bejinbihost** | (hn.I.çewa) Mirovê bejina wî gelek kurt. :Bejinbihostê rih çil gez. |
| **Bejinbilind** | (hn.l.çewa) Mirovê dirêj û bi bejin. |
| **Bejindan** | (k.jn.I.mê) Mezinbûn. Geşbûn. Bilindbûn. :Nemamkê bejin daye. (K) bn: Dan. |
| **Bejindirêi** | (hn.I.çewa) Mirovê bejina wî dirêj û bilind. |
| **Bejinkirin** | (k.jn.I.mê) Bejindan. (K) bn: Kirin. |
| **Bejinzirav** | (hn.I.çewa) Kesê bejina wî zirav. Navtengzirav. |
| **Bektirva** | (n.cîha.x.mê) Candarekê hûrike, bi çav nahêt dîtin. |
| **Beko** | (n.x.nêr) 1. Qehremanê dastana Mem û Zînan, yê ku navbera herdu evîndaran têkdayî.2. Nîşana têkdanê.Têkder.Bekrok. |
| **Bekrok** | (hn.dar.çewa) Mirovê têkder mîna bekoyî. |
| **Bel** | (hn.x.çewa) Diyar . Xuya .Tiştê bilind nexasme jibo guhan tê gotin eger di bilind bin(ji serî), guhbel. |
| **Bela** | (n.x.mê) Derd. Bive. : Malê wan bo bela serê wan. |
| **Beladîtin** | (k.jn.I.mê) Bela di hêt serê mirovî. (K) bn: Dîtin. |
| **Belafiroş** | (hn.dar.çewa) Kesê ku hertim hez ji arêşe ii balayan dike, karên xira dike.: Tu çima hosa yê belafiroşî?. |

| | |
|---|---|
| **Belafirotin(firoştin)** | (k.jn.l.mê) Dema mirov di bit egera bela û nexweşîyan jibo xelkî. (K) bn: Firotin. |
| **Belakir** | (hn.dar.çewa) Belafiroş. |
| **Belakirin** | (k.jn.I.mê) Mirov nexweşî çêke. (K) bn: Kirin. |
| **Belakirîn** | (k.jn.I.mê) Belafiroş. |
| **Belam** | (alav) Belê .Lê.Bes. |
| **Belaş** | (hn.x.çewa) Tişt, mita ê bê hember, bê pare. Herwe. :Te ev cilike belaş yên di kirîn. |
| **Belaşdan** | (k.jn.I.mê) Mirov tişti bide xelkî bê pere li bê hember. Bi herwe dan. : Hevsîyê me keça xwe da yekî belaş. Ang; bê next[qelen]. : Heger tu pêlava xwe belaş bi dî min ez li pên xwe nakim. (K) bn: Dan. |
| **Belaşkirin** | (k.jn.I.mê) Dane xelkî belaş. : îro dikandarekî gundor belaş kiribûn, evca xelkî ji xwe ra di birin. (K) bn: Kirin. |
| **Belatînk** | (n.dar.mê) Pelatînk. |
| **Belav** | (hn.x.çewa) Tişt yan mirovên ji hev dûr. : Pezê me yê belave. Zevîya belav. |
| **Belavbûn** | (k.jn.I.mê) Bijyan. Jihev cudabûn. Jihev piçan. Paş ku dujminî gundê me wêran kirî, em mîna mêrûyên bi per balav bûn.(K) bn: Bûn. |
| **Belavker** | (kara.dar.dn) 1. Kesê tiştî belav diket.2. Pêşkêşker. Nûçeyan belav dike û radigehîne. Belavkerê pişka bernameyên ramyarî. |
| **Belavkirin** | (k.jnlmê) Gehandin. Bijandin. (k) bn: Kirin. |
| **Belavkirî** | (hk.I.çewa) Hatî belav kirin. Ji hev belavbûyî. |
| **Belavok** | (n.dar.mê) Tiştê liser kaxez hatî nivêsîn. Niştî. :Belavoka nûçeyan dê li demjimêr çarê êvarî hêt pêşkêş kirin. |
| **Belbelîtank** | (n.dar.mê) Pelatînk. |
| **Belbûn** | (k.jn.I.mê) 1 Mezinbûn, bilindbûn. 2. Pişkivîn, bişkivîn. Geşbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Belcîka** | (hk,cih.cugra) Welatekê Ewropayîye. Welatê Belcîka. |
| **Belcîkayî** | (tetewn) Mirovê yan mitayê ji Belcîka.Belcîkî. |
| **Belek** | (hn.x.çewa). Kever. reş û sipî bi hevre. belekên befrê,(cihê hin befir û hin ax),.çavên li»elek.ang reş ii sipî. Kewalên belek. |
| **Belekbûn** | (k.jn.I.mê) Befir ji zinar û berojan di buhoje nîve dibe. (K) bn: Bûn. |
| **Belekçav** | (hn.I.çewa) Çavbelek. |
| **Belekî** | (n.dar.mê) Durengî. |
| **Belem** | (n.x.mê) Amêrê veguhaztina mirov û kelûpelan bi rêya avê. Qayîk. Papora biçûk. : Deryaya pirî beleme. |
| **Belemvan** | (n.dar.dz) Yê ku belemê di hajot. Xwedîyê belemê. |
| **Belengaz** | (hn.x.çewa) Hejar. Bê guneh. Sade. : ... mirovekê belengaze. |
| **Belengazbûn** | (k.jn.I.mê) Hejarbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Belengazî** | (n.dar.mê) Hejarî. Neyînî. |
| **Belengazkirin** | (k.jn.I.mê) Hejarkirin. : Rewşa aborî xelkê me yê belengaz kirî. (K) bn: Kirin. |
| **Belê 1** | (ngazkir.dar.mê) Candarê mê yê guhên wê di bel, bizina bel. Miha bel. |
| **Belê 2** | (pêrb) Alavê eyînî (erêkirinê) ye. Erê. :Belê; tu rast di bêjî. Belê weye. |

| | |
|---|---|
| **Belê 3** | (pêrb) Alaveke jibo boçnena berdij bi kar di hêt. Lê : Eve diriste, belê ya dî diristtire. : Ez da hêm seredana te, belê mêvan jibo min hatin. |
| **Belê 4** | (alv. qayîlbûn) Heger mirov digel bûçna êkî bit. Bi yekî ra be.Erê. |
| **Belêkirin** | (k.jn.I.mê) Piştraskirin. Erêkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Belên** | (n.x.mê) Peyman. Soz. |
| **Belêndan** | (k.jn.l.mê) Sozdan. (K) bn : Dan. |
| **Belênder** | (n.dar.dz) Qonterçî. |
| **Belfe** | (n.x.mê) Xap . find. Serdabirin. |
| **Belg** | (n.x.nê) Perên kesik yên bi daran ve di hên. Pelg. :Belgên darê. Pend :Şirînîya darê ji belgale.ang ji ber kesekî ,mirov hez ji mal, mirov û cihên wî bi ke. |
| **Belgdan** | (k.jn.l.mê) Dema belgên daran ve di bin. : Dara hewşê belgên dayn. (K) bn: Dan. |
| **Belge** | (n.x.mê) Tiştê nivîsî, tomarkirî, wenekirî. Grove. : Gelek belge di destê min da hene jibo girtina gunehbarî. |
| **Belgename** | (n.l.mê) Nameyên di hêne bi kar anîn wek belge, grove. Grovename. |
| **Belgih** | (n.dar.mê) Nivîn. |
| **Belgkirin** | (k.jn.I.ê) Qurtifandina belgan. Jêkirîna belgan. : Dayka min belgên mêwê jibo îpraxan jê kirin. (K) bn :Kirin. |
| **Belgmêw** | (n.l.mê) Permêw. :îpraxên belgmêwan. |
| **Belgweran** | (k.jn.l.mê) Belgên daran di kevin. : Li payîzê belgên daran di werin. |
| **Belgwerandin** | (k.jn.l.mê) Mirov yan hêzek belgên daran bi werîne. :Dar belgên xwe di werîne. (K) bn: werandin. |
| **Belgweşan** | (k.jn.l.mê) Belgweran. |
| **Belgweşandin** | (k.in.I.mê) Belgwerandin. (K) bn : Weşandin. |
| **Belifandin** | (k.jn.mê) Serdabirin. Xapandin. : Wî bazirganî ez belifandin. |
| **Belindir** | (n.dar.mê) Mîha du ,sê salî.Berindir. |
| **Beliyandin** | (k.jn.dar.mê) Belêkirin. Erêkirin. |
| **Belkirin** | (k.jn.I.mê) Eşkerekirin. Xweyakirin. Bilinkirin. : Hespî guhêd xo belkirin. Bilindkirin. Qîtkirin. : Hespî, segî guhên xwe bel kirin. (K) bn: Kirin. |
| **Belkirî** | (hk.l.çewa) Hatî belkirin. Aşkerakirî. Serav keftî. |
| **Belkî** | (pêrb) rêzman Alaveke jibo gotineka, bûyereka ne misoger.. Gotina bi goman. Qemî. Dako. Jiber ko. : Ez çim bazarî belkî bo xwe kirasekî bi kirim. |
| **Belko** | (pêrb) Belkî. |
| **Belo** | (ngazkir.dar .nêr) 1. Beran, nêrî ,ango kewalên nêr yên guhbel. 2. Mirovê dilpak. Dilsax. |
| **Belokirin** | (k.jn.I.mê) Aşkerakirin. Xuyakirin. Diyarkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Belûçî** | (nei.n) Neteweyeke li îranê xwecihin. |
| **Belûçistan** | (hk.cih,cugra.dar) Welatê belûçan. |
| **Belxem** | (n.x.nêr) Bilxem. |
| **Ben** | (n.x.mê) Bend. Bendik. |
| **Benav 1** | (n.x.mê) Kulind. Kundik. |
| **Benav 2** | (n.x.mê) Dareke li çiyayên Kurdistanê hişîn di be. |

| | |
|---|---|
| **Benc** | (n.x.mê) 1.Madeyeke dema lêdanê leşê mirovî bê hest dike. :Heker didanê min benc ne bikira, ez ne di wêram bînim der. 2. Mirovê mest. Serxweş. Mirovê hay ji xwe tune. Bêdeng. |
| **Bencbûn** | (k.in.I.mê)Bêdengbûn. Bêhoşbûn. (K) bn : Bûn. |
| **Benckirin** | (k.jn.I.mê) Cihekê leşî yan hemiiyê benc dikin jibo ku mirov ne êşe dema nijterkirinê. : Dansazî didanê wî benc kir û derîna. (K) bn: Kirin. |
| **Bend** | (hn.x.çewa) 1.Reben . êxsîr. Girêdayî.girtî. Zîndanî. 2.Bendê xwedê. 3. bendik. |
| **Bendav** | (n.l.mê) Cihê ko rêya avê bend û dîwar di ken jibo pengandina wê bo karên pêdvî.Pengav. Sikir. :Bendava Duhokê. |
| **Bendbûn** | (k.jn.I.mê) Girêdan. Qedexebûn. (K) bn: Bûn. |
| **Bende** | (hn.x.çewa) Bend. Reben. |
| **Bendek** | (n.dar.mê) 1. Dema barkirina daran li pişta dewaran, çend darekan di êxin ser kurtanî û wek hev rêk dixin daku bar xar nebit û peytbit, paş da, dê darên din danin ser ta bi dawî bêt. Bar ii bendek li hespê xwe kirin. Wekhev. Hevsan. 2. Zehmet. Dijwar. |
| **Bendekkirin** | (k.jn.I.mê) Dirstkirina bendekan Hevsankirin. (K) bn: Kirin. |
| **Bendeman** | (k.jn.I.mê) Li bendê di mînit. Li hîvîyê man. : Ez li benda te mam, tu ne hatî.(K) bn: Man. |
| **Bender** | (n.dar.mê) Cihê rawestana papor û beleman. |
| **Bendewar** | (hn.I. çewa) 1.Kesê dûr ji ax , cih û welatê xwe li bîrî û kovana jibo di kişîne. Evîndadr. Girêdayê warê xwe. Tengezar. 2. Navê xortan yan keçane. |
| **Bendewarbûn** | (k.jn.gl.mê) Korewarbûn. Bîrkirîn. (K) bn : bûn. |
| **Bendewarkirin** | (k.jn.gl.mê) Korewarkirin.: Eve çend salin tu çûyî, te em bendewar kirîn. (K) bn: Kirin. |
| **Bendewarî** | (n.I.nê) Kovandarî. Evîndarî. |
| **Bendeyî** | (n.dar.mê) Nokerî. Xolamînî. Bindestî. |
| **Bendik** | (n.x.nê).Ta yan davên ji dezî stûr tir. Dezîyên têkalandî û dirêj bo girêdana tiştan. Pend :Heger tu bendikê sor û zer bayî, da bi himbanka xwe ve bî!.ang ; kesê bi kêrî xo ne hêt bi kêrî kesê din nahêt. |
| **Bendî** | (pn.x.çewa) Girtî. Zîndanî. |
| **Bendîxane** | (n.dar.mê) Girtîgeh. :Gunehbar êxist di bendîxanê da. |
| **Bendkirin** | (k.jlm) Girtin. Xistine nav zîndanê. : Jiber gunehên xwe hat benkirin. (K) : bn Kirin. |
| **Beng** | (n.x.mê) 1. Benc. 2. Dîn. Mest. 3.Êk ji du karkên çîroka zeng ii beng ê. |
| **Bengî** | (hn.dar.çewa) Bengîn. Mest. |
| **Bengîn** | (hn.dar.cewa) 1. Serxweş. Mest 2. Benckirî(bêhoş) 3. Navê kuran. |
| **Bengkêş** | (hn.l.çewa) Mirovê heşê bi kar dihîne.Bengîn. |
| **Bengkêşan** | (k.in.l.mê) Kêşana heşê. (K) bn: Kêşan. |
| **Benik** | (n.x.nêr) Bendik. |
| **Benî** | (n.x.mê) Dara benî. Dara benokê. |
| **Benîşt** | (n.x.nêr) Madeyek çire ji stirka daran, nemaze dara kezwanê peyda dibit, mirov di devê xwe da di cût bêy dahîrîn. Cîl. Pend:Mîna benîştê keskanan |

| | |
|---|---|
| | ma bi dehmenan ve.ang; mirov rastî arêşeyekê yan kesekê neçak dibe, nikare bi tu rêyan xwe jê derbaz ke. Pend : Bû benîştê devê xelikî.ang ; kesê karekê seyr û ne rast bi ket, hemû kes liser di axivin. |
| **Benk** | (n.cîhx.mê) Cihê dan û wergirtina pereyî. Bank. |
| **Benok** | (n.x.mê) Dara benokê ye li çîyayên Kurdistanê hişîn dibin. Dara benî. |
| **Benq** | (n.cîh.x.mê) Benk. |
| **Beq** | (n.x.mê) hişkavî Giyandarek hişkavîye, gelek çîvanok li ser hatîne gotin. Çembera(simbol) kirêtîyê ye. Beqa pivdayî.ang; mirovê qelew. Pend :Heger beq ne qurit, dê (bi) dirit.ang; mirovê axivtin xwe di devî da na girin. |
| **Beqal** | (kara.x.dz) Yê ku giya û dermanka difirşe. |
| **Beqalî** | (kn.dar.mê) Karê beqalîyê. |
| **Beqalîkirin** | (k.in.I.mê) Mirovê karê beqalîyê dike. (K) bn: Kirin. |
| **Beqbeqok** | (n.dar.mê) 1. Cihê bilqên avê jê di hên. 2 .Peqokên li dest li pêyan dihên. 3. Amaneke rêncber avê di kinê jibo nav zevî û aqaran.Avdank. |
| **Beqlawe** | (n.x.mê) Xwarineka xweş li şirîne ji hevîr û şekirê çê dikin. |
| **Beqlî** | (n.x.mê) giya Core giyayekê pelik pan li keske jibo çêkirina îpraxan yan qelandin û di nav avikan da bikar dihînin. : îparaxên beqlî. Beqlîyên zer kirî. |
| **Beqseme** | (n.x.mê) Coreke şirînîye. |
| **Ber** | (n.x.nêr) 1.Tenekê reqe jibo dîwarên xanî û pêdvîyên avakirînê mifa jê di hêt wergirtin. Kevir.Pend :Ber li cihê xo yê bi qedre.Pend:Yê berê ji xwe mezintir bi hilgire, dê bi serî keve.ang; karê ji şiyanên mirovî mezintir, ne pêdvî kirinê ye.Pend :Beran ne havêje kanî ya te av jê vexwarî. Ang: (emekdarî) qencîyê jibîr neke.2. Tuxmê giya ii giyandaran. Berhem. Berê darên fêqî. Mita.: Me hijîreka mezin di hewşê da heye, lê mixabin ya bê bere. 3. Sing. Sent. : Berê xwe bi de min. |
| **Bera** | (pêrb) rêzman Alaveke jibo pejirandinê û daxwazkirinê bikar di hêt. Bila. |
| **Beraber** | (hk.cih) Beramber. Singûsing. |
| **Beradan** | (k.jn.I.mê) Havêtin hevdu. Di êkdu werkirin.. Berek dana wî. (K) bn: Dan. |
| **Berafî** | (n.x.mê) Şirove. |
| **Beraftin** | (k.jn.x.mê) Şirovekirin. Di beraft,bi berêfe, dê bi berêfim,.... |
| **Berahî** | (hk.dem,n.dar.mê) Destpêk. Pêşekî. :Li berahîyê bi navê xwe pêrgînîyê li mêvanan di kem. Brx Dawî. |
| **Beramber** | (hk.cih,.çewa) Du tişên berê wan li hev be.Mala min beramberî a wane. Singûsing. |
| **Beramberbûn** | (k.jn.I.mê) Beramberê hev di bin.Rûbirûbtin.Hember hev di rawestin.(K)bn: Bûn. |
| **Beramberî** | (hn.dar.çewa) Rûbirû. : Ez li beramberî seydayê xwe rûniştim. |
| **Beramberkirin** | (k.jn.I.mê) Kevtine beramber hev. Hevberkirîn. Wekhevkirin. Rûbirûkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Beran** | (n.x.nêr) Tuxmê nêr ê pezî ye. Dûmahîk qonaxa gehiştinê ye.(berx, kavir, ..şek ,beran). Pend :Serê du beranan di dîzekê da nakelin. |
| **Beranek** | (n.dar.mê) Tilîya beranî. |
| **Beranî 1** | (hn.x.çewa) Gelemperî. Tebayî. Zarekî. Ne fermî. |

| | |
|---|---|
| **Beranî 2** | (n.x.mê) 1. Tilîya mezin ya destî. Beranek. 2. Paçika mezin ya pêyî |
| **Beraqil** | (hn.l.çewa) Tiştê yan gotina cihê bawerîyê. Bêgoman. |
| **Beraş** | (n.I.n) Du berin di kin distarên aşî , liserêk zivrîna wan danî hwîr diken, di bit ar. Pend :Berên beraşan avê birin tu pisyara kengirperan dikey.ang ; dema çamek di bit, mirovek pisyara tiştên bi biha bi ket. |
| **Beraşo** | (n.dar.nêr) Berav. Husan. : Bi beraşo devê dasê hisî. |
| **Beratav** | (hn.l.çewa) Kesê pir nexweşî ii derd di hên serî.: Wey babo ew çi mirovekê beratave!. |
| **Berav1** | (n.I.n) Berek nemazeye jibo husîn, xweşkirin yan seqakirina das û bivran bi kar di hînin. Husan. |
| **Berav 2** | (n.I.mê) 1.Perav. Ser lêva avê. 2.Li ber avêye jibo şûştinê. |
| **Beravêtin** | (k.jn.x.mê) Berhavêtin. :Bizinê beravêt. |
| **Beravkirin** | (k.jn.I.mê) 1. Hisîn. 2. jêrvkirin.şûştin. (K) bn : Kirin. |
| **Beraz** | (n.x.dz) candar 1. Giyandare(ginawerek kîvî yan kehî ye.sîmbola qelewî û gemarîyê ye. Di hindek dînan da (Islamê û cuhî) herimîye û goştê wî herame. 2. Nîşana gemar û pîsî yê. |
| **Beraze** | (n.dar.nêr) Asinek reqe jibo jihev cudakirina tiştên req bikar di hêt.Lîhaz.. |
| **Berazgeh** | (n.dar.mê) Cihê ku beraz lê di mişene. Mexela berazan. |
| **Berazî** | (hn.dar.çewa) Karên ne çê yên mîna berazan mirov, bi taybet zaro di kin. Gemarî. |
| **Berazîkirin** | (k.jn.I.mê) Xirabîkirin. Serreqîkirin. : Berazîyan neke kuro!. (K) bn: Kirin. |
| **Berazkuj** | (n.l.mê) Corekê nemaze, yê guleyên çifteyane[tivenga nêçîrê] jibo kujtina berazan bikar di hînin. |
| **Berayî** | (hk.dem,n.dar.mê) Berahî. |
| **Berba** | (hn.l.çewa) Li ber bayî. Hilêvirî. : Xwarina berba ya pîse. |
| **Berbabûn** | (k.jn.l.mê) Liber bayî man. (K) bn: Bûn. |
| **Berbakirin** | (k.jn.l.mê) 1. Liber bayî danan. :Cilik berba kirin dako zuha bi bin. 2. Danebayî. :Savar berba di ke da sivivî jinav derkeve. (K) bn: Kirin. |
| **Berbad** | (hn.dar.çewa) Gemar. Pîs. Herimî. |
| **Berbadkirin** | (k.jn.I.mê) Pîskirin. (K) bn: kirin. |
| **Berban** | (n.I.mê) Banek nizim e di kevit ber banekê dî û di bit hewş jibo malê, ku jibo rûniştinê bi kar di hêt. |
| **Berbang** | (hk.dem.n.l.mê) Berê spêdê.Elind. : Li berbangê seda çû mizgeftê. |
| **Berbar** | (kn.dar.dz) Mirovê baran bi pişt, yan galiskeyan kelûpelan ji cihekî bo yê dî di veguhêzit. |
| **Berbejin** | (n.I.mê) Dareke cilikan pêve di kin. Darê hilwîstina cilan. |
| **Berbejink** | (n.I.mê) Nivişti. Hemaylok. |
| **Berbelav** | (hn.dar.çewa) Tişt yan mirovê ji hev dûr ii cuda. |
| **Berbelavbûn** | (k.jn.I.mê) Parvebtin ji hev dûr ketin. : Pişti me zanîngeh bi dawî anî, hevalên me li welati berbelav bûn û heryek li cihekî kar di ke. (K) bn: Bûn. |
| **Berbelavî** | (n.I.mê) Belavbûn. Jêkvebûn. |
| **Berbelavkirin** | (k.in.l.mê) Ji hev dûr xistin. (K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **berben** | ( n.dar.mê) Corekê ristikane jin bi kar di hînin, bi kulavî ve girêdaye, di bin guhanû di bin erzinkê ra di bûrit. |
| **Berbend** | (hn.I.çewa) Karê ku nabit bi hêt kirin. Qedexe. :Çûnejor berbende. |
| **Berbendbûn** | (k.jn.l.mê) Pengîn. Der lê hatin bend kirin. |
| **Berbendî** | (n.I.mê) Qedexe. |
| **Berbendkirin** | (k.jn.I.mê) Qedexekirin. : Rijêmên dagîrker zimanê kurdî li xwendingehan berbend kirî ye. (K) bn: kirin. |
| **Berber** | (nej,n) Neteweya berber. |
| **Berberî** | (nej.dar.dz) Mirovê bi nejad berber. |
| **Berbest** | (hn.I.çewa) Berbend. Girtî. Dûrpêç. Sikir. |
| **Berbestî** | (n.I.mê) Berbendî. |
| **Berbestkirin** | (k.jn.I.mê) Dîwarkirin. Rê lê girtin. Berbendkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Berbext** | (hn.l.çewa) Mirovê jîyê wî nêzî ji 13 tanî 18 salî. Sinêle. |
| **Berbêj** | (pîşn.l.dz) Mirovê paşeroja xelikî di bêje. Xêvzan. |
| **Berbiber** | (hn.dar.çewa) Hêdî. Hêdîhêdî. Gav bi gav. Berebere. : Em dê ber bi ber dest bi karê xwe bi kin. |
| **Berbisk** | (n.I.mê) Toq. Têle. |
| **Berbûk** | (kam.I.mê) Keça ku bi bûkê reye di dema şahîyê ku xizmetê jêra dike û şîretan di de wê. Pend :Kî dibe bûk tu xwe dikî berbûk!. Ang; Kesê mayê xwe di her tişti di ke. |
| **Berçav** | (hn.I.çewa) Xuya. Diyar. Eşkera. : Xebata we gelek ya berçave. |
| **Berçavk** | (n.I.mê) Şûşeyên mirov jibo baştir dîtinê dixin çavên xwe. :Çavan seydayê me baş nabînin, jiber hindê berçavkê di ke çavan. |
| **Berçavkirin** | (k.jn.l.mê) Desnîşankirin. Çavên xwe liser danîn. :Te êk ji xwe ra berçav kirîye ?. (K) bn : kirin. |
| **Berçavkirî** | (hk.I.çewa) Hatî berçavkirin. Destnîşankirî. |
| **Berçek** | (hn.I.çewa) Çekdar. Bi kêr çek higirtinê di hêt. |
| **Berçem** | (n.I.mê) Lêva çem. Rexê robarî. |
| **Berçêlk** | (nl.mê) Li cem teyran cîyê xarin di çitê . zik. Gede. Hefik. Bersing. |
| **Berçile** | (n.x.mê) Meha duwazdeye .Kanîna biçûk. |
| **Berçîcek** | (n.dar.mê) Berçêlk. |
| **Berçîn** | (n.dar.mê) Çeperê(dergeh) kosk li kotanan. |
| **Berçûn** | (k.jn.I.mê) ji ber çûn, Zarok ji ber daykê çûn. Berhavêtin. : Biçûk ji ber çû. (K)bn:Çûn. |
| **Berd** | (n.x.nêr) Ber. Kevir. |
| **Berdan** | (k.x.mê) 1.Derêxistin. Azadkirin. Ji girtîgehê berdan, jina xwe berda. 2. Di paşde hiştin. Hêlan. Bi cih hêlan. 3. Ne pejirandin. (K) bn: dan. |
| **Berdar** | (hn.dar.çewa) 1.Dar, giya yan giyandarên ber di girin. Sêv, zerdil, xox, a berdar. Dara berdar.ang; dara bi ber. 2. bi Kêrhati. Xwedî karîn. 3. Gehişti. |
| **Berdayî** | (hn.dar.çewa) Azadkirî. Hatî berdan. |
| **Berdeborîn** | (n.dar.mê) Destûrî. Pêhêlan. Bihêl. |
| **Berdeq** | (n.dar.mê) Lîztineke du yan pitir zaro li ser pêyekî radiwestin û milên xwe li hev dixin tanî yek bi keve. |

| | |
|---|---|
| **Berdeqanî** | (n.dar.mê) bendikek dirêj û nîva wî cihê beran lê heye, ba di din û bera pê di havêjin. |
| **Berdeqkirin** | (k.jn.I.mê) Dema mirov yarîya berdeqê di kin. (K) bn: Kirin. |
| **Berdereş** | (devera.l.mê) devereke li Kurdistana başûr. |
| **Berdestk 1** | (n.I.mê) Pateyeke didin ber destê xwe li dema hilgirtina amanên xwarinên yên gerim, jibo destên mirovî ne sojin.: Berdestkê bi de ber destêd xo, çaydank yê kele. |
| **Berdestk 2** | (n.I.dz) Mirovê karê yekî dike û pêdivîyan liber desti di dane.Murîd. Şagird. |
| **Berdest** | (hn.I.çewa) Berhev. Amade. : Kelûpelên pêdivî berdest ke, daku em herin seredana dostê xwe li nexweşxanê. |
| **Berdestbûn** | (k.jn.gl.mê) Berhevbûn.(K) bn: Bûn. |
| **Berdestik** | (n.I.mê) Du perçe patene şêwe bazin, lakêşe, sêkujî û htd bi bendekî bi hevre girêdayîne mirov didin berdestên xwe jibo girtina qazan li dervankêd kel(gerim) daku dest ne sojin. Destir. Destgir. |
| **Berdestî** | (hn.I.çewa) Deshil. Berkevti. |
| **Berdestkirin** | (k.jn.gl.mê) Berhevkirin. : Min hemû kelûpelên xwe berdest kirine, çunkî suba dêwexerê kem.(K) bn: Kirin. |
| **Berdevk** | (pîşn.I.dz) Kesê li şûna welatek,alîyek yan sazîyekê di axivit. Boçûna wan dibêjit. Peyvdar. :Berdevkê dewletê. |
| **Berdevkî** | .(n.I.mê) Karê şîretvanîyê. |
| **Berdewam** | (hn.çewa) Hertim. Dirêjdem.bêkuta. |
| **Berdewambûn** | (k.jn.I.mê) Mirov liser karekî, gotinekê berdewam be. Bê rawestan. : îro barîna baranê ji sibê ta êvarê ya berdewam bû. : Keremke liser gotina xwe berdewam be. (K) bn: Bûn. |
| **Berdewamî** | (n.dar.mê) Ne rawestan. Hertimî. |
| **Berdewamkirin** | (kin.I.mê) Liser ya xwe man bê rawestan. (K) bn: Kirin |
| **Berdevk** | (pîşn.l.dz) Kesê li şûna welatek,alîyek yan sazîyekê di axivit. Boçûna wan dibêjit. Peyvdar. :Berdevkê dewletê. |
| **Berdêlî** | (n.dar.mê) 1. Li ciyê. Li şûna. 2. Pêgihork. |
| **Berdij** | (hn.l.çewa) Karvedana her pestanek yan hêzekê ye. Kardan. |
| **Berdijbûn** | (k.jn.gl.mê) Kevtin hember yek. Rû bi rû bûn. (K) bn :Bûn. |
| **Berdijkirin** | (k.jn.gl.mê) Danan berhember hev.Hevberkirin. (K) bn:Kirin. |
| **Berdil** | (n.dar.dz) 1. Bîranîn. 2. Evîndar. Dilber. |
| **Berdilk** | (n.I.mê) Ristika bi stoyê xwe ve di kin ii dilikek pêveye, di keve ser singî. Dilik. |
| **Berdîwar** | (n.I.mê) Cihê rûniştinê liber dîwarên malan. |
| **Bere 1** | (n.x.mê) Enî. Sing. Berok. Pêşî. |
| **Bere 2** | (hn.x.çewa) Pirt. Pîçek. Hêdî. Gav bigav. Berebere. |
| **Berebere** | (hn.l.cewa) Gav bi gav. Pîçpîç. |
| **Berecot** | (n.I.mê) Berên aşî. Du berên distarî. Beraş. |
| **Beredan** | (k.jn.x.mê) Berdan. |
| **Berendam** | (n.I.dz) Kesê destnîşankirî jibo hilbijartinê. Berbijar. |

| | |
|---|---|
| **Berste** | (n.dar.mê) Bereke ii perçe hesineke li hev dixin jibo peydakirina agirî. Sitewber. |
| **Berevajî** | (hn.l.çewa) Tiştê ber û piştên wî hatîn lêkzivirandin. Berûpişt. Berdij. : Berevajîya hatinê çûn e. |
| **Berevajîbûn** | (k.jn.gl.mê) Lêkwergeran. Lêkzivirîn. (K) bn: Bûn. |
| **Berevajîkirin** | (k.jn.gl.mê) Berûpiştkirin. : Te kirasê berevajî li ber xwe kirî! .(K) bn: Kirin. |
| **Berevajîkirî** | (hk.l.çewa) Cil yan tiştê hatî berevajî kirin. :Kiraskê te yê bervajî kirî ye!. |
| **Berevan** | (hn.dar.çewai 1. Kesê di keve navbera kes, xelkek, ji pêxemet ne hêlana şer û nakokîyê.dudilîlê. 2. Navê kurane. |
| **Berevanî** | (ndar.mê) Karê berevanîyê. Navbijî. |
| **Bervanîkirin** | (k.jn.gl.mê) Navbijîkirin. Ewan şer di kirin, min berevanî di kir. (K) bn: Kirin. |
| **Berevankar** | (hk.I.çewa) Kesê yarînekarê wî berevanî. Parêzer. |
| **Bereyîsk** | (n.dar.mê) Darlastîk. Bertivk. |
| **Berê** | (hk.dem) Dema çûyî. Ji mêje. Di kevinda. |
| **Berêbihar** | (cugm, 1) Gundeke li devera Duhok- Kurdistan Iraqê. |
| **Berêxwedan** | (k.jn.I.mê) Temaşekirin. Hêvkirin. Mêzekirin. : Berê xwe bi dê wê kîye ji wê ve di hêt?. (K) bn: Dan. |
| **Berêz** | (hn.dar.çewa) 1. Hêja. Rêzdar. Birêz.2. Nave mirovane. |
| **Berf** | (n.x.mê) Befir. |
| **Berfavêj** | (n.I.mê) Befrîk. |
| **Berfende** | (n.dar.mê) Cihên pêyan yên çekirî di nav befirê de, jibo ku mirov ne keve. |
| **Berfiravîn** | (n.I.mê) Xwarineka sivike berî zadê nîvro[firavîn] mirov di xwe, xasim pale û rêncber. : Demhijmêr yanzde me berfiravînk xwar. |
| **Berfireh** | (hn.I.çewa) Cihê fireh û mezin. : Mala berfireh. Xwarina berfireh; ang. Pir. Zaf. |
| **Berfirehbûn** | (kin.I.mê) Cih fireh û mişe biin. (K) bn: Biin. |
| **Berfirehî** | (n.I.mê) Erzanî. Bê mineti. Cih fireh û mezin. |
| **Berfirehkirin** | (k.jn.I.mê) Mezin ii fireh kirin. (K) bn: Kirin. |
| **Berfirehkirî** | (hk.I.çewa) Hatî berffireh kirin. Mezinkirî. Mala berfirehkirî. Cihê berfirehkirî. |
| **Berfî** | (hn.dar.çewa) Rengê sipî xweşik mîna berfê. |
| **Berfîn** | (hn.dar.çewa) 1.Cihên pir berf lê di bare. Befrîn. :Kurdistan welatekê befrîne.2. Navê keçan. |
| **Berg** | (n.x.mê) Cilik. Kevil. Kiras. |
| **Bergeh** | (n.dar.mê) Meydan. Qad. Depê şanûyê. |
| **Berger** | (kara.dar.dz) Zêrevan. Nêrevan. Çavdêr. |
| **Bergeryan** | (k.jn.l.mê) Li dû tişti çûn. Li peyçûn. (K) bn: Geryan. |
| **Bergir** | (hn.dar.çewa) Asteng. Rêgir. |
| **Bergirî** | (n.I.mê) Berevanî. |
| **Bergirtin** | (k.jn.I.mê) Avisbûn. Ragirtin. (K) bn: Girtin. |
| **Bergirtî** | (hk.I.çewa) Xweragirtî. Avisbûn. |
| **Bergîz** | (n.dar.pir) Cilikên kurdî yên zelaman, ji merezî di hên ristin. Şal û şepik. |
| **Bergkirin** | (k.jn.I.mê) Kiraskirin. (K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Berguh** | (n.l.mê) Du serikên di kin guhên xwe jibo guhdarîya radyo, têlefon ii htd. |
| **Berhelistî** | (hn.dar.çewa)Berhingarî. |
| **Berhelstkar** | (hn.l.çewa) Dij. Ne pê re. |
| **Berhem** | (n.dar.nêr) Ber. Tuxim. Karpêk. :Berhemê xebata gelê me ev azadî ya em li bin sîbera wê di jîn. |
| **Berhemdar** | (hn.gdar.çewa) Bi ber. Bi berhem. Berdar. |
| **Berhemberbûn** | (k.jn.gl.mê) Keftin heber yek. Rûbirûbûn. |
| **Berhemberkirin** | (k.in.gl.mê) Anîn hember yek. Kevtin bersingê hev. Rûbirûkirin. |
| **Berhev** | (hk,hn.dar.çewa) Amade. Peyt. : Ezê berhevim, da bi çîn. |
| **Berhevbûn** | (k.jn.gl.mê) Amadebûn. (K) bn : Bûn. Ez yê berhev bûm jibo çûne seyranê, lê tu ne hatî!. |
| **Berhevî** | (n.dar.mê) Amadeyî. :Berhevîya xwe diyar kir, jibo yarî yê |
| **Berhevîkirin** | (k.jn.I.mê) Xwe berhev kirin.: Emê berhevî ya xwe di kin jibo ahengê |
| **Berhevkirin** | (k.jn.I.mê) Amadekirin. :Ezê xwe berhev di kin jibo seredana mamê xwe. (K) bn: Kirin. |
| **Berhevok** | (n.dar.mê) Belavok. |
| **Berhingar** | (hk.dar.çewa) Dij. |
| **Berhingarbûn** | (k.jn.I.mê) Dij rawestan. Bersing lê girtin. :Li aqarî marek berhmgarî min bû, bi kotekî min xwe qurtal kir. (K) bn- Bûn. |
| **Berhingarî** | (n.dar.mê) Ne pê re. Ne digel. Dij. |
| **Berhingarkirin** | (k.jn . gl .mê) Dijatîkirin . |
| **Berhingav** | (hn.dar.çewa) Berhingêv. |
| **Berhigêv** | (hn.dar.çewa) Lezgîn. Bi lez. Lezûbez. |
| **Berik** | (n.dar.mê) 1.Reşmal. Mêzer. Pend :Berika xwe ji avê derîna.ang; Xwe ji tengasîyê qurtal kiv.Pend :Pîyên xwe hindî berika xwe di rêj ke.ang ; Mirov karên ji xwe mezintir neke.2 Bere piçûk. GuIle. Berik ê dariastîkî. Berikê tivengê. Berikê mekînê, .. û htd. |
| **Berî** | (n x.mê) 1. Berê darberîye . Berû. 2. Dara berî ya li çiyayên Kurdistanê pire. 3. Deştek pan û mezin, nexasim xîz bit. |
| **Berîk** | (n.x.mê) Cihên çal, nexasime li cilkan çêdiken jibo hilgirtina pare li pêdvîyan. Kûrik. Gîrfan. |
| **Berîkanê** | (n.I.mê) Core yarîne di navbera du kesan , biran da tê kirin ka kî dê bi serkevit. Kêbirkê. |
| **Berîkanêkirin** | (k.jn.I.mê) Lîztika berîkanê di kin. (K) bn: Kirin. |
| **Berîmask** | (n.l.mê) Berîyên darmazîyê . Berê dara mazî. |
| **Berieng** | (n.l.mê) Nîşan. : Berjengên baranê hir û bane. |
| **Berjewendî** | (n.dar.mê) Giring. Mifa. : Kar di keyn jibo berjewendîya giştî. |
| **Berjêr** | (hk.I.çewa) Sernişîv. Serşor. |
| **Berjêrbûn** | (k.jn.gl.mê) Bernişîvbûn. Xwarkevtin. (K) bn: Bûn. |
| **Berjêrkirin** | (k.jn.gl.mê) Sernişîvkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Berjêkirî** | (hk.I.çewa) Hatî berjêr kirin. Hatîye sernişîvkirin. Cerikê berjêrkirî |
| **Berjor** | (hk.I.çewa) Serevraz. |
| **Berjorbûn** | (k.jn.gl.mê) Serevrazbûn. :Karwanî li çiyayî berjor bûn. (K) bn: Bûn. |

| | |
|---|---|
| **Berjorkirin** | (k.jn.gl.mê) Serevrazkirin. :Destên xwe berjorkirin ji xuda niza di kin. (K) bn: Kirin. |
| **Berjorkirî** | (hk.I.çewa) Berê wî/wê/wan daye serî. |
| **Berkaş** | (n.dar.nêr) Helan. Kevir. Kaşeber. :Binê mezela me hemû berkaşe. |
| **Berkaşkirin** | (k.jn.I.mê) Kaşîkirîn. Helankirin. :Dîwarê nexweşxanê berkaş kirin. |
| **Berkatok** | (n.dar.mê) Mita , feqî yar mazî, yên bi awayek xwezayî du yan pitir pêkve nûsayî bin. |
| **Berkel** | (hk.l.çewa) Zadê nîv kelî. Zadê kelek hatîyê:Dê xwe bi girin camêr xwarina me ya berkele, ha vê gavê de berhev bit. |
| **Berkelbûn** | (k.jn.gl.mê) Kelel hînan zadî. :Zadê me yê berkel bûy. . :Me mirîşka danaye ser agirî, gelek nemaye berkel bi be. |
| **Berkelkirin** | (k.jn.gl.mê) Kelek yan çend kelek hatîne zadî. Nêzîke bi kelit. :Min zadê berkel kirî. |
| **Berkele** | (n.dar.mê) Golika nêzî sê salan. :Gavanî golika berkele firot. |
| **Berkeş** | (n.dar.mê) Sênî. Sînî. |
| **Berkeşk** | (n.dar.mê) Berkeşok. Ferxesênî. Sînîya biçûk. |
| **Berkevtin** | (k.jn.I.mê) Bi kêr hatin. Hêja. (K) bn: Kevtin. |
| **Berkevtî** | (hk,hn.dar.çewa) Hêja. Kêrhatî. |
| **Berkêr** | (hk.I.çewa) 1. Kewalê bi kêr serbirînê[serjêkirin] dihêt]. 2. Qurban. |
| **Berkêrbûn** | (k.jn.I.mê) Bi kêrî serjêkirînê di hêt. :Kelebang berkêr bû, êdî dem hat,dê serjê bi kîn.(K) bn: Biin. |
| **Berkêrkirin** | (k.jn.I.mê) Mezinkirin û anîn ber kêrê. (K) bn: Kirin. |
| **Berkêşk** | (n.I.mê) Galiskeya ber kêşanê. Erebaneya beran.:Me berên xanîyê xwe hemû bi berkêşkê kêşan. |
| **Berkoş** | (n.I.mê) Kiraseke ji alîyê singîve di kin ber xwe, jibo parastina cilan dema karkirinê, mîna; pezdotin amanşûştin û htd. |
| **Berkur** | (n.dar.mê) Cihê xwarin di çe nav pişti ji gerîyê derbaz dibe. Gede. Zik. :Berkura mirovan. :Berkura tewalan. |
| **Berkurk** | (n.dar.mê) Berçêlk. |
| **Berlêker** | (n.gl.mê) rêzman Pêşgir. Pêşpirt. |
| **Bermak** | (hk.l.çewa) Zaro yan têjikên candaran yên sava. Berşîr. |
| **Bermal** | (n.I.mê) 1. Eywana rûniştinê. Jûra pêrgînîyê. 2. Bersiv. :Mêvan hatin, jin li bermalê , rûniştin li mêr li mêvanxanê. |
| **Bermal** | (n.I.mê) Kabanî. Kewanî. : BermaIîya te ji kûye?, ji amedê ye. |
| **Bermalk** | (n.I.mê) Berik. Reşmalk. :Bermalk li bermalê raxist. |
| **Berman** | (k.jn.dar.mê) Ji ber man. Tiştê ji ber di mîne, zêde di be. (K) bn: Man. |
| **Bermax 1** | (n.dar.mê) Defterka cigaran. Perikên cigaran. |
| **Bermax 2** | (n.dar.mê) Sapîtik. Bersapîtik. |
| **Bermayî** | lCn.dar.mê) Tiştê zêde di mîne. :Bermayîyê xwarinê bi dem kewalan. |
| **Bermêj** | (n.I.mê) Giyandar û zarokên li ber singê mak û dayk a xwe şîr di mêjin. Bermak. |
| **Bermîl** | (n.x.mê) Amaneke neftê û avê tê di kin. :Bermîla gazê bi çendê ye?. :Avê ji bermîlê vala ke!. |

| | |
|---|---|
| **Bername** | (n.dar.mê) Program. Pilan. :We îro çi bemame heye, hûn dê çi bi ken?. |
| **Bernaş,..niyas** | (hk,hn.I.çewa) Yê ko mirovan zû di nase, yan gelek mirovan di nasit û berevajî. . Berniyas.:Xalê min gelek yê bernase. |
| **Bernav** | (n.I.nêr) Navê mirovî yê êkê, berahîkê. Nav. Brx Paşnav. : Navê te yê sêqolî; Azad Lezgîn Baran e, ango bernavê te Azade. |
| **Bernexûn** | (hk.dar.çewa) Sernişîv. Berjêr. |
| **Bernexûnbûn** | (k.jn.gl.mê) Sernişîvbûn. Berjêrbûn. :Kedîn bernexûn bû av rijya. (K) bn: Bûn. |
| **Bernexûnkirin** | (k.jn.gl.mê) Sernişîvkirin. Berjêrkirin. |
| **Bernixûn** | (nhn.dar.çewa) Bernexûn. |
| **Berniyas** | (hk.dar.çewa) Bernas. |
| **Beroş** | (n.x.mê) Qazan. Quşxan. Dîz. :Beroşa kutildewê ya mezine. |
| **Berpaş** | (hk.l.çewa) Piştûpişt. Paşve. |
| **Berpaşçûn** | (k.jn.I.mê) Bizivîneke mirov piştûpişt di çe. |
| **Berpeyî** | (n.dar.mê) Bersiv. Bersivdan. |
| **Berpêk** | (n.I.pir) 1. Bendikên nemaze jibo girêdan û peytkirina deling û goreyan. 2. Dema xwelêkdanê herkes pêkolê di ke pêyê xwe bi de ber yê hemberê xwe jibo ko li erdê bi xe.3. Astengî. Alozî. |
| **Berpêkdanan** | (k.jn.gl.mê) Piyêd xwe xistin ber êk dako yek yekî li erdî bi de. :Ew ne di karî min lê wî berpêk danan. |
| **Berpêş** | (n.I.mê) Pilan. Berhevî. |
| **Berpêşkirin** | (k.jn.gl.mê) Berhevkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Berpisyar** | (kara.dar.dz) Kesê bi rêvebirina karekî bi stoyê xwe ve digire. Serkêş. |
| **Berpisyarî** | (n.dar.mê) Serkêşî. Rêberî. |
| **Berpisyarkirin** | (k.jn.gl.mê) Kar û guneh xistine ser milên yekî. (K) bn: Kirin. |
| **Berra** | (pêrbest.alv.pêvgir) Di ber re. Di rex re. : Ez di ber ra borîm. |
| **Berran** | (n.I.mê) can Pişkeka leşîye di keve navbera binê zikî û dawîya serê ranî. |
| **Bersev** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê hatine jor ya malan. Nihanî. |
| **Bersiv** | (n.dar.mê) Vegerandina pisyara kesekî.: Pisyara min ya bê bersiv mayî. Brx Pisyar. |
| **Bersivdan** | (k.jnlmê) Mirov pisyara hemberê xwe bi de. : Min pisyarek kir, lê te bersiva min neda!. (K) bn: Dan. |
| **Bersivk** | (n.dar.mê) Bersev.Bermal. |
| **Bersoj** | (n.dar.mê) derd Dema mirov hin xwarinên qelew yan zêde di xwe, berkura mirovî mandî di be, di soje li birkên tamasojtî jê dihên. : Jiber xwarina savarê bersoj ya hatî min. |
| **Bersork** | (n.l.mê) 1. Berên rengê wan sor. Kevirên sor. 2. tewal Corekê çûçikane singê wan yê sore. |
| **Bersto** | (n.l.nêr) Pisto. |
| **Bersûç** | (hk.I.çewa) Gunehbar. Gunehkar. |
| **Bersûçbûn** | (k.jn.gl.mê) Gunehkarbûn. :Min hay ji çi nîne û ez bi guneha te bersûç di bim!.(K) bn: Bûn. |

| | |
|---|---|
| **Bersûçkirin** | (k.jn.gl.mê) Gunehbarkirin. :Ji nezanîna xwe, xwe bersûç di ke. (K) bn: Kirin. |
| **Bersûçkirî** | (hk.I.çewa) Hstî gunehbarkirin. Pend :Bersûçkirî bê gunehe, ta guneha wî xuya ne be. |
| **Berşîv** | (n.I.mê) Xwarina sivik ya berî şîvê |
| **Bertav** | (hk.cih,n.I.mê) Cihê gerimê hetav lê di keve, mirov lê di rûne,Li ber hetava rojê. Liber tava rojê. |
| **Bertavkirin** | (k.jn.gl.mê) Mirov tişkekî dane ber tava rojê jibo gerim û hişk bi be. : Eve te çîye heval te ho xwe bertav kirî?. (K) bn: Kirin. |
| **Berteng** | (hk I.çewa) 1. Cihê tengavî. Cihê teng, kêm. Cihê têra neke. : Xanîyê me gelek ê bertenge, jiber hindê me divêt bi firoşîn.2. Berê perokî yê biçûke, tenge. |
| **Bertengbûn** | (k.jn.gl.mê) Cihê ko teng dibe. Tengasî dibe. (K) bn: Bûn, |
| **Bertengî** | (n.l.mê) Tengavî. Qetlazî. |
| **Bertengkirin** | (k.in.gl.mê) Tengkirin. : Mêvanan ber pêyên me yên teng kirîn. (K) bn: Kirin. |
| **Bertêker** | (n.dar.mê) Perê xurde. Hûrde. |
| **Bertêşt** | (n.I.mê) Xwarina sivik ya berî têştê. Sertêşt. |
| **Bertivk** | (n.dar.mê) 1. Berên biçûk mirov di nav tibilên xwe di havêe, dengê tivên jê di hêt. 2. Qosk. Lastîk. |
| **Bertîl** | (n.dar.mê) Diyarîyeke di din yekî ko ji mirovî re kareld,rêberîyekê bi ke. Pend:Bertîl beran nerim di ke. |
| **Bertîldan** | (k.jn.l.mê) Wekî mirov bertîlekê di de kesek, perpirsekî. (K) bn: Dan. |
| **Bertîlder** | (kara.dar.dz) Kesê bertîlê di de. |
| **Bertîlgirtin** | (k.jn.I.mê) Mirov bertîlan werdigire. (K) bn: Girtin. |
| **Bertîlgir** | (kara.dar.dz) Kesê bertîlê werdigire. |
| **Bertîlkirin** | (k.jn.I.mê) Mirov êkî bertîl bi ke. (K) bn: Kirin. |
| **Bertûrk** | (n.l.mê) Berkurk. Gede. |
| **Berû** | (n.x.mê) 1. Dara Berî. 2. Berê darberûyê. Berî. |
| **Berûk** | (n.dar.mê) 1. Gerî. 2. Enî. 3.Destpêk. |
| **Bervajî** | (hk.I.çewa) Berevajî. |
| **Bervale** | (hk.dar.çewa) Hejar. Berteng. Bêber. |
| **Bervank** | (n.dar.mê) Tiştê di din ber xwe dako cil û laşê wan gemar nebe. Perçeyê di xin ber kemaxên zarokan dako xwe pîs ne kin. |
| **Bervedêr** | (pîşn.dar.dz) Parêzer. |
| **Bervekirin** | (k.jn.I.mê) Berê wî vekirin. Vajîkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Bervekirî** | (hk.l.çewa) Vajîkirî. Vekirî. |
| **Berwar** | (hk,hn.dar.çewa) 1. Xar. Xarûvîç. Pêç. Çep. 2. Navê mêrane. |
| **Berwarbûn** | (k.jn.I.mê) Pê hilçiin. Vêraçûn. Di ber re çûn. (K) bn : Bûn. |
| **Berwarî** | (malb,n) Tîreyeka kurdane. |
| **Berwarkirin** | (k.jn.gl.mê) Xwarkirin. Keçkirin. |
| **Berwarkirî** | (hk.l.çewa) Hatî xwarkirin. Xwarkirî. |

| | |
|---|---|
| **Berx** | (n.x.dn) candar Têjikê pezan. :Berxê nêr. :Berxa mê. Pend:Berxê liber makê.ang; bo mirovê nazandî di bêjin. Berxê min.Pend :Berxê nêr bo serbirînê ye.ang; weke mêrçak rastê tengavîyan di bin yan di hên kujtin. |
| **Berxik** | (n.dar.dn) Berxê biçûk. |
| **Berxistin** | (k.jn.dar.mê) 1. Aşkerakirin.2. Hînkirin. (K) bn : Xistin. |
| **Berxistî** | (n.dar.mê) Pêşniyar. |
| **Berxudan** | (k.jn.I.mê) Xebata bê rawestan. Bergirî. Berevanî ji dozek pîroz. Berxwedan. |
| **Berxudar** | (hn.dar.çewa) Jîdirêj. Paraztî. Pîroz. Supasdar. |
| **Berxudarbûn** | (k.jn.I.mê) Jiyan baş bûn. Jî dirêjbûn. (K) bn: Biin. |
| **Berxudarî** | (n.dar.mê) Supasdarî. |
| **Berxvan** | (pîşn.dar.dz) Kesê çavdêrîya berxan dike. Xwedîyê kerê berxan. : Lawê wî berxvane. |
| **Berxwarin** | (n.I.mê) Xwarina sivik mîna şorbe ii giyayî, mirov berî zadî di xwe. |
| **Berxwarî** | (hn.I.cewa) Yê ko berê dahatî di xwe. |
| **Berxwedan** | (k.jn.I.mê) Berxudan. : Gelê kurd jibo azadîyê liber xwe di de.(K) bn: Dan. |
| **Berxwekevtin** | (k.in.gl.mê) Şerimkirin. Ji xwe fedîkirin. Daman. Berxweketin.(K) bn: Kevtin. |
| **Berxwekevtî** | (hn.gl.çewa) Ji xwe şerimkirî. Ji xwe fedîkirî. Damayî. |
| **Berxweraçûn** | (k.jn.gl.mê) Kesê hertim cilên xweşik li ber xwe di ke li Pûte bi rêkûpêkîya xwe di de. Xwe peytkirîn. : Te çi guh lê bûye, van rojan tu gelek di ber xwe ra di çî?. (K) bn: Çûn. |
| **Berxwerawestan** | (k.jn.gl.mê) Dema mirov ageh ji kiryar û gotinên xwe hebe û tu şaşîyan meke. (K) bn: Rawestan. |
| **Berxwerawestayî** | (hn.gl.çewa) Mirovê xwe ji ne rindîyê bi parêze. |
| **Berxwêr** | (n.dar.mê) Zevîya mezin. Erdê çandinê. |
| **Beryekî** | (n.I.mê) Kesatî. Taybetî. |
| **Berz** | (hn.x.çewa) Bilind. |
| **Berzbûn** | (k.jn.I.mê) Bilindbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Berze** | (hn.x.çewa) Hinda. Nediyar. Nexweya.Winda.Bêserûşûn. : Eve tu li kûveyî, herê berzeyî ?. |
| **Berzebûn** | (k.jn.I.mê) Hindabûn. : Cizdanka min ya berze bûy. :Xwe berze neke min karekê bi te hey!. (K) bn: Bûn. |
| **Berzekirin** | (k.jnlmê) Hindakirin. Bêserûşînkirin. Windakirin.: Min parên xwe berzekirin. (K): Kirin. |
| **Berzik** | (n.I.mê) candan Binzik. |
| **Berzin** | (n.dar.mê) Canîk. Cehşik. |
| **Berzinçî** | (nejadn.dar.dz) 1. Hozeka kurdane. 2. kesê ser bi hoza berzincî. |
| **Berzî** | (n.dar.dz) 1. Bilindî. 2. Navê mêrane. |
| **Berzîne** | (n.dar.mê) Berên rengereng. |
| **Berzkirin** | (k.jn.I.mê) Bilindkirin. (K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Bes** | (pêrb) 1. Alavê vebirkirinê ye.Bitinê. : Bes tu digel min were.2 Alavê nehiştinê. Nabit. Ne. Nerînî. :Bes wesa bike.3. Alavê hevberkirinê. Lê.Lêbelê. |
| **Besbûn** | (k.jn.l.mê) Hişbûn. Bedengbûn. Bi dawîhatin. (K) bn: Bûn. |
| **Bese** | (pêrb) Bes.Têra heye. Fermane jibo bi dawî anîna kar û gotinan. |
| **Besezman** | (hn.dar.çewa) Bêguneh. Bêdeşelat. Belengaz. Kesê neşê berevanîyê ji xwe bike. |
| **Besîre** | (n.dar.nêr) Tiîyê ne gehiştî. Bêsîre. |
| **Beskirin** | (k.jmê) Bi domahî înan. Vebirîn. Bi dawî anîn.Kutakirin. :Dê bes ke camêr tu çend dirêj di kî!. :Ma te hêjta xwarin bes nekirîye?. (K) bn: Kirin. |
| **Besna** | (n.I.mê) Navê jinane dema daybaban hêş zaro bi vên vî navî li kiça xwe di kin. |
| **Best** | (n.x.mê) Iêva çemî. Rexê rûbarî yê zuha û bi xîz û cercîr. Li bestê xwe dirêj kir. |
| **Beste** | .(n.x.mê) 1. Peste. 2. Deste. Qeft. |
| **Bestek** | (n.dar.mê) 1. Pivdank. 2. Qeft. 3. Perçe erd. Zevî. |
| **Besterûbar** | (n.I.mê) Hişkayîyê ber lêva riibarî. Best. |
| **Bestevîn** | (hn.dar.çewa) Seqayekê evînî,dilveker. Sermest. |
| **Bestik** | (n.dar.mê) Cok, Rûbark. |
| **Bestin** | (k.jn.x.mê) Girêdan. :Peymanek best. Girêyek best. Derî best. (K) Bdn: Ez di bestim em dibestîn, tu dibestî hûn di bestin, ew di beste ewan di bestin. Pr Dê[bi] + bdn. Bdb :di best, di bestin. Db,dûr : bestibû, bûn. (F) : bi beste, bi bestin. |
| **Bestî** | .(n.dar.mê) 1. Qerîsî. Bestîyê erdê, ava girtî Erdê bestî. 2. Qerîsa li ser erdî ketî.3. Girtî, pêçayî, riiyê xwe yê bestî. |
| **Beş** | (hn.x.çewa) 1 . Jêkvebûyî. Vekirî.2. Tiştê kur[khur]. Ew mirovekê dev beşe Pend :Kêvroşk candarekê beşe.ang ; Bela di hîne rêya mirovî. |
| **Beşbûn** | (k.jn.l.mê) Jêkvebûn. Vebûn.: Devê wî ji keyfan beş bû. (K) bn: Bûn. |
| **Beşdar** | (hn.dar.çewa) Pişkdar. |
| **Beşdarbûn** | (k.jn.gl.mê) Pişkdarbûn. (K) bn : Bûn. |
| **Beşdarî** | (n.dar.mê) Pişdarî. |
| **Beşdarîkirin** | (k.jn.gl.mê) Pişkdarîkirin. (K) bn : Kirin. |
| **Beşdarkirin** | (k.jn.gl.mê) Pişfstkitin. (K) bn: kirin. |
| **Beşkirin** | (k.jn.I.mê) Jêkvekirin. Vekirin. (K) bn: Kirin. |
| **Beşûş** | (hn.x.çewa) Mirovê ji kêfan devê wî beşe. Kêfxweş. Devkenî. Debeng. |
| **Beten** | (n.x.mê)l. Tenişta girekî . Evrazî. Berik û beten. Min dît dema kew ji betenê di firî. Pend :Mineta te li betenê, şîva te di legenê. 2. Texeyên perokan. Qemsele, çakît,,htd. Du betene. |
| **Betil** | (n.x.nêr) Amanekê şûşeye, dirêj û lûleyîye, şileyan tê di kin. |
| **Betilîn** | (k.jn.x.mê) Mandîbûn. Westan. Pelixîn. (K) bdn: ez di betilim em di betilîn, tu di betilî hûn di betilin, ew di betile[...it] ewan di betilin. Pr: dê [bi] + bdn. Bdb: di betilîm, di betilîn, betilî. Db,dûr: betilîbûm, bûyn, bûy,... bû... bûn. (F) : bi betile, bi betilin. |

| | |
|---|---|
| **Betir** | (hn.dar.çendî) 1. Pêtir. 2.Berî.wêvetir. |
| **Betirpêr** | (hk.dem.l) Berîya sê rojan. |
| **Betirpêrar** | (hk.dem.I) Berîya sê salan. |
| **Bevil 1** | (hn.x.çewa) Mirovê nimone. Serpişk.Behredar. Gevil. : . . .mirovekê bevile. |
| **Bevil 2** | (hn.x.çewa) Hevrik. :Ma tu bevil ê minî?. |
| **Beweko** | (pêrb) rêzman Alaveke jibo hevberkirinê bi kar di hêt. Herweko. |
| **Bewr** | (hn.x.çewa) Dirinde. Kûvî. :Gur candarekê bewre. |
| **Bewreşînk** | (n.dar.mê) Êşeke pîsîye. Nexweşîyeka çermîye. |
| **Bexçe** | (n.dar.nêr) Bax. Baxik. Rez. Cinîk. |
| **Bexçevan** | (n.dar.dz) Xwedîyê bexçe. Baxvan. Rezvan. |
| **Bexirîn** | (k.jnxmê) Azirîn. :Ev zaroke yê bexirî. Bixirîn. |
| **Bexşişandin** | (k.jn.I.mê) Bexşîşkirin. |
| **Bexsîn** | (k.jn.x.mê) Dan. Diyarîkirin. Pêşkêşkirin. |
| **Bexşîş** | (n.dar.mê) Diyarî. Xelat. |
| **Bexşîşdan** | (k.jn.I.mê) Diyarîkirin. Xelatdan. :Zavayî bexşîş dan diholvanî. (K) bn: Dan. |
| **Bexşîşkirin** | (k.jn.I.mê) Xelatkirin. (K) bn: Kirrin. |
| **Bext** | (nax.nê) 1. Şens. 2. Tor. Wijdan.: Xwe havêt bextê axa, ku li wî bibore. |
| **Bextçak** | (hn.l.çewa) Bişens. Bextyar. Brx Bextreş. |
| **Bextçê** | (hn.I.çewa) Bextçak. |
| **Bextdan** | (k.jn.I.mê) Mirov soza lêborînê bide yekî .Lêborîn. Azakirin.: Heger tu bextê xwe bidî min, ezê werim rayê. (K) bn: Dan. |
| **Bextdar** | (hn.dar.çewa)Bextyar. |
| **Bextiyar** | (hn.dar.çewa) 1.Keyfxweş. Dilxweş. Bê arêşe. Asode. Ew di jiyana xo da mirovekê bextiyare. 2. Navê mêrane. |
| **Bextiyarî** | (n.dar.mê) Xweşî. Aramî. :Xudê betiyarî bi de gelê me. |
| **Bextreş** | (hn.l.çewa) Mirovê bextê wî hetim reş. Bêşens. Brx Bextçak. |
| **Bextreşbûn** | (k.jn.gl.mê) Mirov bêşens di be, çamek bi serê mirovî di hêt, mirov di karekîa di keve. |
| **Bextreşî** | (n.l.mê) Bêşensî. Xwelîserî. |
| **Bextreşkirin** | (k.jn.gl.mê) Bela bi serî anîn. Xwelî bi yekî werkirin. |
| **Beyan** | (nx.dz) Navê keçane. |
| **Beyanbûn** | (k.jn.I.mê) Xweyabûn. Diyarbûn. Stêra subê beyan bû. (K) bn: Bûn. |
| **Beyanî** | (hkcih) Sipêde. |
| **Beyankirin** | (k.jn.I.mê) Xweyakirin. Dyarkirin. : Viyana xwe ji nim ra beyan ke. (K) bn: Kirin. |
| **Beyankirî** | (hk.I.çewa) Ronkirî. Zelalkirî. |
| **Beyanname** | (n.I.mê) Ragehandina beyanekê. irin.Daxuyanî. Daxweyanî. |
| **Beyar** | (hn.x.çewa) 1. Erdê ne kolayî. Zevîya ne çêkirî. :Em dê zevîya xwe evsal hêlîn beyar. irin.2. Navê mêrane. |
| **Beyarbûn** | (k.jn.I.mê) Cih, zevî, bax û htd, ko êdî na hêt çavdan û sexbêrkirin. Bûne beyan. Rezê te yê bûye beyar. |
| **Beyarhêlan** | (k.jn.l.mê) Ne kolan û sexbêrkirina erdî. Çemê xwe hêla beyar. |

| | |
|---|---|
| **Beyarkirin** | (k.jn.I.mê) Rez ,bax, û htd, hêlan beyar. Sexbêr nekirina rez û baxan , ne kolan û adekirin. |
| **Beybûn** | (n.x.mê) Corek gulane. |
| **Beyef** | (n.x.mê) Behîv. Bahîv. |
| **Beyîn** | (k.jn.x.mê) Behîn. |
| **Beytik** | (n.x.mê) Sivandok. Sivyank. |
| **Beyiv** | (n.x.mê) Bahîv. |
| **Bez** | (nx.nêr) Rûnê gîyandaran. |
| **Bez** | (n.x.mê) Rev. |
| **Beza** | (hn.dar.çewa) Rehwan. Hespê beza ango; hespê rehwan. |
| **Bezan** | (k.jn.x.mê) Bezîn. : Ez bezam. Ew beza. Here bi beze. |
| **Bezandin** | (k.jn.dar.mê) Mirov tiştekî bibezîne. Rateqandin. (K) bdn: ez di bezînim em di bezînîn, tu dibezînî hûn di bezînin, ew di bezîne[...it] ewan di bezînin. Pr: dê[bi]+bdn. Bdb : di bezand, di bezandin. Db,dtir: bezandibû, ....bûn. (F) : bi bezîne, bi bezînin. |
| **Bezdonek** | (hn.dar.çewa) Bizdiyayî. Bizdonek. : Ey hewar eve çi mirovekê bezdoneke. |
| **Bezek** | (hn.dar.çewa) Beza. Bi xar.: Mirovê bezek.ang; mirovê pêsivik. |
| **Bezeyî** | (hn.dar.çewa) Dilşewatî. |
| **Bezgirtin** | (k.jn.I.mê) Jiber qelewbûnê leşê mirvî bez di gire. Qelewî. (K) bn: Girtin. |
| **Bezgirtî** | (hn.I.çewa) Mirovê, candarê leşê wî pir bez. Mirovî pir bez. Mirovê qelew. |
| **Bezîn** | (k.Jmê) Revîn.Xarkirin. Xardan. (K) Bdn: ez dibezim em di bezîn, tu di bezî hûn di bezin, ew di beze[. . .zit] ewan di bezin.Pr: dê[bi] + bdn. Bdb: dibezîm, dibezî, dibezîn. Db,dtir: Bezîbûm, ...bûyn, .. bûy,...bûn. (F) : bi beze, bi bezin. |
| **Bezok** | (pn.x.çewa) Kesê di beze. Leşsivik. Bi bizav. |
| **Bê** | (pêrb) Alavê neyîkirinê. Nabit. Neyînî. Netê. Nejê. Zirbarkirin. Bê, mal ,bê bawer, bê welat...bê xudan, ... bê ser.htd. |
| **Bê ah** | (hn.I.çewa) Ne bi tu alîyan re. Bêlayen. |
| **Bêbab** | (pn.I.çewa) 1. Babmirî. 2. Bîjî.3. bêwijdan. |
| **Bêbabî** | (n.I.mê) 1. Sêwîtî. 2. Bêwijdan. Xwe nenas. |
| **Bêbar** | (hn.I.çewa) 1.Bara mirovî têda nebe. Zirbar.2. Ne barkirî.: Dewarê bêbar,ang ; bar li piştê nekirîye. |
| **Bêbarbûn** | (k.jn.gl.mê) Bara wî/wê, têda tuneye. Zirbarbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Bêbarî** | (n.l.mê) Zirbarî. |
| **Bêbarkirin** | (k.jn.gl.mê) Zirbarkirin. : Wan xweha xwe ji mal milkan bêbar kirî. (K) bn: Kirin. |
| **Bêbarkirî** | (hk.I.çewa) Hatî bêbar kirin. Zirbarkirî. |
| **Bêbav** | (n.I.dz) Bêbab. |
| **Bêbavî** | (n.I.mê) Bêbabî. |
| **Bêbawer** | (hn.I.çewa) 1. Mirovê bawerî bi xwe nebe.2. Lewaz. 3. Bêdîn. |
| **Bêbawerî** | (n.I.mê) Bawerî bi hebûnê tunebûn. |
| **Bêbelên** | (hn.I.çewa) Bêsoz. |

| | |
|---|---|
| **Bêber** | (hn.I.çewa)1.Candar û giyayên berî nagirin. Stewir. Xirş.2. Teng. Peroyê berê wî teng. |
| **Bêbext** | (hn.I.çewa)1. Bêwijdan. Dilreq.2. Bêşens. 3. Xwefiroş.4. bêbawer. |
| **Bêbextî** | (n.I.mê) Soz şikênan. Îxanet. |
| **Bêbextîkirin** | (k.jn.gl.mê) îxanetkirin. Sozberdan. Direw lê kirin. Xapandin. (K) bn: Kirin. |
| **Bêbin** | (hn.I.çewa) 1. Cihê kûr. 2. gotina vala. Bêbingeh. : Deryaya bêbin. |
| **Bêbinbûn** | (k.jn.gl.mê) Weke bin bi tişti ve nemîne. Binê wê/wî jê ve bûye. (K) bn: Biin. |
| **Bêbingeh** | (hn.gl.çewa) Gotina ne cihê bawerîyê. Pûç. |
| **Bêbinkirin** | (k.jn.gl.mê) Binê tişti jêvekirin. Binê tişti pûçkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Bêcan** | (hn.I.çewa) Mirovê, candarê mirî. |
| **Bêcerg** | (hn.I.cewa) Tirsonek. Kulekfireh. |
| **Bêcih** | (hn.I.çewa) Bêwar. Bêmal. |
| **Bêçare** | (pn.I.çew) 1.Lewaz. Bêgav. 2. Pîr. |
| **Bêçarebûn** | (k.jn.gl.mê) 1.Pîrbûm. 2. Lewzbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Bêçarekirin** | (k.jn.gl.mê) 1.Lewazkirîn. 2. Pîrkirin. : Xemên mal û zarokan ew yê bêçara kirî. (K) bn: kirin. |
| **Bêçarejl** | (n.I.mê) 1. Lewazî. Bêgavî.2. Pîrî. |
| **Bêçav** | (hn.I.çewa) Kore. |
| **Bêgek** | (hn.l.çewa) Mirovê çekê wî tune be. |
| **Bêçekkirin** | (k.jn.gl.mê) Çek jê standin. Ji çekkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Bêçekkirî** | (hk.I.çewa) Mirovê hatî ji çek kirin. |
| **Bêçeng** | (hn.l.çewa) 1. Bêper.2. Bêrê. Bendewar. |
| **Bêçengkirin** | (k.jn.gl.mê) 1. Bêperkirin. Çeng lê birîn. 2. Bendewarkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Bêçî** | (n.x.mê) Tilîyên pêyan. Pêçik. |
| **Bêdad** | (hn.I.çewa) Bêwijdan. Şêlî. |
| **Bêdadî** | (n.l.mê) Bêwijdanî. Ne rastî. Mafxwarin. |
| **Bêdawî** | (hn.l.çewa) Tiştê dawîya wî tune be. Bê dûmahîk. |
| **Bêdayk** | (hn.I.çewa) Daykmirî. Sêwî. |
| **Bêdeling** | (hn.I.çewa) Ezmandirêj. Bêhetik. Bêşerîm. |
| **Bêdeng** | (hn.I.çewa) Mirovê kêm di peyve. Mit. Pend : Bêdengî zikê pirbêjî dirand. :Zarokekê bêdenge. |
| **Bêdengbûn** | (k.jn.gl.mê) Hişbûn. Mitbûn. :Heger hûn bêdeng nebin em nikarîn civîna xwe bi bin serî.(K) bn: Nûn. |
| **Bêdengî** | (n.I.mê) Mitî. Kerî. Ne xivtin. : Bêdengî nîşana qayîlbûnê ye. |
| **Bêdengkirin** | (k.jn.gl.mê) 1. Hişkirin. Hema xwe bêdeng bi ke jibo te baştire. 2. Hawîşkirin. Vî zarokî bêdeng bi ke. 3.Kujtin. (K) bn: Kirin. |
| **Bêdengkirî** | (hk.I.çewa) Deng jê hatî birîn. Hatî kujtin. Hatî bêpêjinkirin. |
| **Bêderew** | (hn.I.çewa) Gotina derew tê tune be. Bêgoman. |
| **Bêderman** | (hn.I.çewa) Birîna derman jêra tune be.: Derdê bêderman. |
| **Bêdidan** | (hn.I.çewa) Pîrê didanên wîne mabin. Pend :Xwedê goştî didet bê didanan. |

| | |
|---|---|
| **Bêdil** | (hn.l.çewa) Karê ne bi dilê mirovî be. : Ez bêdil xwarinê di xwem. |
| **Bêdilî** | (n.l.mê) Bê gêwilî. Dilşikênan. |
| **Bêdilîkirin** | (k.jn.gl.mê) Mirov dilê yekî bişkêne. Dilê êkî bi hêlit. : : Tu bi xudê bêdilî ya zarokan ne ke. :Ew zaroryek sêwî, nabe bêdilî ya wî bihêt kirin. (K) bn: Kirin. |
| **Bêdiran** | (hn.l.çewa) Bêdidan. |
| **Bêdîn** | (hn.l.çewa) Kesê bawerîya wî bi dînan tuneye. Kesê ne liser çi dînan. Bêbawer. Bê ol. |
| **Bêfedî** | (hn.l.çewa) Mirovê fedî ji xwe nake. Bêşerim. |
| **Bêfehêt** | (hn.l.çewa) Bêfedî. |
| **Bêfirşik** | (hn.l.çewa) Merivê bi kêrî xwe û kesê nayê. Bêbawer. Bêzax. |
| **Bêgar** | (hn.l.çewa) Kesê karî bê pere û bê hember dike. |
| **Bêgav** | (n.l.mê) Neçar. Bêrê. Neçar. |
| **Bêgavbûn** | (k.jn.gl.mê) Neçarbûn. Bêrêbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Bêgavî** | (n.l.mê) Neçarî. |
| **Bêgavkirin** | (k.jn.l.mê) Neçar kirin. : Min bêgav neke her bi axivim!. |
| **Bêgavkirî** | (hk.l.çewa) Neçarkirî. Bêrêkirî. |
| **Bêgavman** | (k.jn.gl.mê) Neçarman. Man bê rê. (K) bn: Man. |
| **Bêgerd** | (hn.l.çewa) Bêguneh. |
| **Bêgêwil** | (nhn.l.çewa) Bêkeyf. Damayî. |
| **Bêgêwilbûn** | (k.jn.gl.mê) Gêwilê mirovî di şikê.Dilçirmisîn. |
| **Bêgêwilkirin** | (k.jn.gl.mê) Gêwilfisandin. Gêwilşikandin.: Bi xudê te ez gelek bêgêwil kirim, ko te wesa got!. |
| **Bêgêwilî** | (n.l.mê) Dema mirov yê bê gêwil be. Kiz. |
| **Bêgiyan** | (hn.l.çewa) Mirî. Bêcan. |
| **Bêgoman** | (pêrb )Alavê misogerkirinê. Gotina goman têde tuneye, sedased raste. |
| **Bêgoşt** | (hn.l.çewa) Lewaz. |
| **Bêgoştbûn** | (k.jn.gl.mê) bn :Lewazbûn. |
| **Bêgova** | (cugrn.hk.cih) Gundeke li Kurdistana bakûr. |
| **Bêguneh** | (hn.l.çewa) Kesê guneh nebin. Kesê ji kiryareka xirab bêbar be.bêgerd. Pak. Çak. |
| **Bêgunehbûn** | (k.jn.gl.mê) Weke çi guneh li cem mirovî dernekeve.: Ew yê bê guneh bû. |
| **Bêgunehkirin** | (k.jn.gl.mê) Ji gunehê rizgarkirin. Bêguneh derêxistin. : Dadgehê ew bêguneh kir. |
| **Bêhay** | (hn.l.çewa) Weke merivî ageh ji xwe nebe.Hay ji çi nîne.Bêhiş. Bêhoş. |
| **Bêhaybûn** | (k.jn.gl.mê) Hay ji xwe neman. Ageh ji xwe neman. (K) bn: Bûn. |
| **Bêhempa** | (hn.l.çewa) Mirovê bi kar û kiryarên xwe yên qenc ji xelkî cudaye. Nimone. Tek. Bevil. |
| **Bêhengam** | (hn.l.çewa) Mirovê, xelk ji gotin û kiryarên wî hêris dibe. |
| **Behetik** | (hn.l.çewa) Bêfedî. Bêfehêt. Ezmanpîs. : Ez naxazim çi caran xwe di wî hilkem, hindî mirovekê bêhetike. |
| **Bêheval** | (hn.l.çewa) 1. Mirovê hevalên wî nebin. Tenê. 2. Bêhevrê. Bêhempa. |
| **Bêhevrê** | (hn.l.çewa) 1. Bêheval. Tinê. 2. Bêhempa. |

| | |
|---|---|
| **Bêhêz** | (hn.l.çewa) Merivê sist. Merivê hêza wî tunebe. Bêçare. Lewaz. |
| **Bêhêzbûn** | (k.jn.gl.mê) Bêçarebûn. Xavbûn. Sistbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Bêhêzî** | (n.l.mê) Sistî. Lewazî. Xavî. |
| **Bêhêzkirin** | (k.jn.gl.mê) Lewazkirin. Hêz jê birîn. Hêz tê nehêlan. (K) bn: Kirin. |
| **Bêhin** | (n.x.mê) 1. Hatin û cûna bay bo nav sîhan(singî) û bervajî. 2. Karê difinê (kepî) bi nasîna cuda kirina tiştan. Bêhna xweş , nexweş (gemar).3. Demek kurt, gavek, bîstek. |
| **Bêhinav** | (hn.l.çewa) Tirsonek. Kulekfireh. |
| **Bêhinavî** | (n.l.mê) Tirsonekî. Kulekfirehî. : Wey bavo bêhinavîyê weha li te kiriye ku tu ne wêrî ji mal derkevî. |
| **Bêhinberdan** | (k.jn.l.mê) Dema mirov bêhinekê belav bike, berde. : Bêhina gulavê yan bêhinên din berdide. . (K) bn: Berdan. |
| **Bêhinbiserketin** | (k.jnl.mê) Ji egera gelek westanê bêhina mirovî bi lez dihêt û di çit. |
| **Bêhinçik** | (hn.l.çewa) Mirov, candarê bi zehmet yan nikare bêhina xwe bîne û bibe. |
| **Bêhinçikbûn** | (k.jn.l.mê) Bêhina mirovî bi zehmet yan na hêt û biçit.Bêhinkurtbûn..: Jiber dûkêla cigaran bêhna min çik bû. (K) bn: Bên |
| **Bêhinçikî** | (n.l.mê) Derdeke ku bêhina mirovî teng di bit. Bêhinkurtî. |
| **Bêhinçikkirin** | (k.jn.gl.mê) Dema tiştek bêhina mirovê çik dike. : Tu dikarî çend çirkeyan bêhina xwe çik bi kî?. (K) bn: Kirin. |
| **Bêhindan** | (k.jn.l.mê) 1. Tiştê bêhinê dide. Fêkî bêhina xweş didit. 2. Xwe xavkirin. Bêhinvedan. 3. Nêrîn. Balkişandin. (K) bn: Dan. |
| **Bêhindar** | (hn.dar.çewa) Tiştê bi bêhin. Tiştê bêhin jê di hêt. : Gul, sêv, gulav û htd a bêhindar. |
| **Bêhingirtin** | (k.jn.l.mê) Tiştê bêhin di kevitê, bêhinê di gire.: Cilên min bêhina cigaran yên girtîn. Bêhindan. (K) bn: Girtin. |
| **Bêhinfireh** | (hn.l.çewa) Mirovê zû tore nabe, her tiştî bi zanîn û liser xwe encam di de.Milpan. Baldirêj. Babo mirvekê gelek bêhinfirehe. Brx Bêhinteng. |
| **Bêhinfirehî** | (n.l.mê) Xwe ragirtin. Tore nebûn. Milpanî. : Çi ji bêhinfirehîyê baştir nîne. |
| **Bêhinfirehbûn** | (k.jn.gl.mê) Weke bêhina mirovî fireh di be. : Aha ji nû bêhina min fireh bû , pa(K) bn: Bûn. |
| **Bêhinfirehkirin** | (k.jn.gl.mê) Mirov xwe hêris neke. (K) bn: Kirin. |
| **Bêhinînanûbirin** | (k.jn.l.mê) Karê mêjtina bay bo nav sîhan û derêxistin. (K) bn: înan, birin. |
| **Bêhinkirin** | (k.jn.l.mê) Gîyandar bi rêya kepîyê bêhina tiştî ji hev cihê di ke. (K) bn: Kirin. |
| **Bêhinkurtbûn** | (k.jn.l.mê) Dema bêhina mirov kurt di be. (K) bn: bûn. |
| **Bêhinkurtkî** | (n.l.mê) Ji egera nexweşî yan westanê bêhinçikî mirovî di girit. |
| **Bêhinpak** | (hn.l.çewa) Dilpak. Çak. Hêja. |
| **Bêhinpakî** | (n.l.mê) Çakî. Dilpakî. |
| **Bêhinteng** | (hn.l.çewa) 1. Kesê bi zehmet bêhina xwe bîne û bibe.2. Kesê zû hêris di be. Bê aram. |
| **Bêhintengbûn** | (k.jn.l.mê) 1.Bêhina mirovî teng di bit. 2. Tengavbûn. (K) Bûn. |
| **Bêhintengî** | (n.l.mê) 1.Bêhinçikî. 2. Tengavî. |

| | |
|---|---|
| **Bêhinvedan** | (k.jn.l.mê) Xwe xav kirin ,xwe rihet kirin.Dilvekirin. : Ez gelekê mandî bûym, dê bêhina xwe vedem. |
| **Bêhnefs** | (hn.dar.çewa) Kesê zêde hez ji xwarinê di ke û di xwaze parîyê xweş ji wîra be. Mirovê çavtarî bo xwarinê. |
| **Bêhnefsî** | (n.dar.mê) Çavtarî jibo xwarinê. |
| **Bêhnefsîkirin** | (k.jn.l.mê) Weke meriv bêhnefsîyê di ke. (K) bn: Kirin. |
| **Bêhnijîn** | (k.jn.x.mê) Ji egera xuranekê yan livînekê li bêvila merivî, bayekê bihêzdar û dengdar ji kepîyê derdikeve û bê mirov bi kare bi rawestîne.(K) bdn: ez di bêhnijim em di bêhnijîn. Tu di bêhnijî hûn di bêhnijim, ew di bêhije[…it] ewan di bêhnijin. Pr: dê[bi]+ bdn. Bdb : ez di bêhnijîm em di bêhnijîn, tu di bêhnijî, hûn di bênijîn, ew di bêhnijî ewan di bêhnijîn. Db,dûr : Bêhnijîbûm, bûyn,..bûy,..bû…. Bûn. (F) : bi bêhnije, bi bêhnijin. |
| **Bêhnijk** | (n.dar.mê) Bêhnijîna ji difin a mirov derdikeve. Pişkîn. : Bêhinjka te pir dendare (bi denge) !. Bêhnijka min nehat. |
| **Bêhnok** | (n.dar.mê) rêzman.Nîşaneke di nava rêzikêd nivîsaranda, li dema xwendinê mirov hinekê di rawestit. Nîşana (,) . |
| **Bêhnok Bêjan** | (hn.l.çewa) Bê êş. Ne jan. |
| **Bêjanî** | (n.l.mê) Ne êşan. : Dermanê bêjanî yê,ango ; dermanê jan rawestanê. |
| **Bêjankirin** | (k.jn.gl.mê) Derman yan derzî dane merivî jibo rawestana jana leşî. Benckirin. (K) bn : kirin. |
| **Bêje** | (p.x.mê) 1. Gotin. Peyv. Axivtin. : Tu dizanî bêjeya KURDISTAN ji çend pîtan pêkhatîye? 2. bêje fermana [gotin]e, ang ; bi peyve. Bi axive. : Ka navê xwe bêje?. |
| **Bêjekar** | (pîşn.dar.dz) Kesê gotinan di ke. Peyvdar. |
| **Bêjevan** | (pîşn.dar.dz) Mirovê semînarê di de. Bêjedar. |
| **Bêjing** | (n.x.mê) Bêjînk. |
| **Bêjînk** | (n.x.mê) Amêreke ji depek çemandî şêweyê bazin bi bendikên çermî hatîye raçandin, bo jêk(ji hev) cudakirina dan û gilêşî .bi livandineka bazinî, dan di binda diçe û ka, zil ber(tiştê zêde) biser dikeve.Arjing. |
| **Bêjînkkirin** | (k.jn.l.mê) Danî li bêjînkê di ken jibo ji zîwanê pakij bi be. :Savar li bêjîngê kir. (K) bn : Kirin. |
| **Bêjok** | (n.dar.dz) Pirbêj. :Bêjoko ma devê na kevit serêk?. |
| **Bêjtin** | (k.jn.x.mê) Gotin. di bêjim di bêjîn di bêjî, di bêjin di bêje, bêje. di bêjin. Bi bêje, bi bêjin. |
| **Bêkar** | (hn.l.çewa) Merivê tu kar nebin. |
| **Bêkarî** | (n.l.mê) Nebûna karî. Pend :Jer ji bêkarîyê baştire. |
| **Bêkes** | (hn.l.çewa) 1. Mirovê kesê xwe tunebe. Bêxwedî. Bêxudan. 2. Navê mêrane. |
| **Bêkesî** | (n.l.mê) Bêxudanî. |
| **Bêkeskirin** | (k.jn.gl.mê) Ji kesûkaran kirin. Bê xwedîkirin. : Xwedê kesê bêkes neke. (K) bn : Kirin. |
| **Bêkesman** | (k.jn.gl.mê) Bêxwedîman. : Piştî bavê wî mirî ew ma bê kes û bê xwedî.(K) bn: Man. |

| | |
|---|---|
| **Bêkeyf** | (hn.l.çewa) Damayî. Posîde. Bêgêwil. : Te çiye tu evro yê bêkeyfî?. |
| **Bêkêr** | (hn.l.çewa) Bi kêr nehatî. Bêwic. |
| **Bêkuta** | (hn.l.çewa) Bêdawî. Bêdûmahî. |
| **Bêl** | (n.x.mê) Hesineke pane, destekekê darî pêve heye, jibo kolana erdî bi kar di hêt. |
| **Bêla** | (nax.mê) Xanîyê mezin û du sê texe. |
| **Bêlan** | (n.dar.mê) 1. Cihê hişk û gerim. Berî. Biyaban. 2. Cihek bilinde di navbera du çeman. 3. Pile. Peyîsk. |
| **Bêlayen** | (hn.l.çewa) Bê alî. Ta negir. |
| **Bêlbêlava** | (n.l.mê) Yarîyek (lîstik)a zarokane, kîskekî di kuna(borî)a banî ra ber di din xwarê û di bêjin : bêlbêlava xudê kurê hew bi kit zava . dako xwedîyê malê şekirok, gîz yan kezwanan bo bi kene kîskê wan û dubare hil di kêşin serî û ve di ken kanê çi bo kirîyê. |
| **Bêlkirin** | (k.jn.l.mê) Erd bi bêlê kolan.(K) bn ; kirin. |
| **Bêmik** | (n.x.mê) Rengekê keskanên hûrikin. |
| **Bênivêj** | (pn.l.çewa) Herimî, gemar nemaze ji alî dînîve. :Mirovê bênivêj.ang ; mirovê herimî, mirovê nimêjan neke. |
| **Bênivêjî** | (n.l.mê) Dema jin heyvane avê di bînin. |
| **Bênivêjbûn** | (k.jn.gl.mê) 1.Hatina xola bênivêjîya jinan ya mehane. 2. Herimîn. (K) bn : Bûn. |
| **Bêr** | (n.x.mê)1. Pezdûtin. 2. Mer a kulanê . |
| **Bêrdoş** | (n.l.mê) Amaneke jibo dotina giyandaran bi kar di hêt. Setil. |
| **Bêrîvan** | (pn.l.çewa)1.Keç, kabanî a diçe bêrê jibo dotina pez û bizinan. 2. Navê keçane. |
| **Bêserûber** | (hk.gl.çewa) Mirovê bêserûber ;ang mirovê ne lêkdayî. Verêlyayî. Karê bêserûber ang ; karê sist, xav karê nerind. karê bi kêmasî. |
| **Bêserûberbûn** | (k.jn.gl.mê) Jepilîn. Tengavbûn. Jepirzebûn. |
| **Bêserûberî** | (n.gl.mê) Tengavî. Nerêkûkûpêkî. |
| **Bêserûberkirin** | (k.jn.gl.mê) Tengavkirin. Jepilandin. Jepirzekirin. :Xwe bêserûber ne ke em dê herin mal. |
| **Bêserûçav** | (hk.gl.çewa) Bêhetik. Bêrûmet. Necamêr. :Zelamê bêserûçav. Jina bêserûçav. |
| **Bêsûç** | (hn.l.çewa) Bêguneh. |
| **Bêsûçbûn** | (k.jn.gl.mê) Bêgunehbûn. |
| **Bêsûçî** | (n.l.mê) Bêgunehî. (K) bn :Bûn. |
| **Bêsûçkirin** | (k.jn.gl.mê) bêgunehkirin. (K) bn:Kirin. |
| **Bêsûçkirî** | (hk.l.çewa) Bêgunehkirî. |
| **Bêşerim** | (hn.l.çewa) Bêfedî. Zirşerim. :Wey babo eve çi mirovekê bêşerme. |
| **Bêşerimî** | (n.l.mê) Zirşerimî. Jerim nekirin. |
| **Bêşiyan** | (hn.l.çewa) Bêkêr. Lewaz. Sist. Kêrnehatî. |
| **Bêtam** | (pn.l.çewa) 1. Xwarina tama wî tune.2. Mirovê bêtam,ang ; mirovê xwîntal. Zinx. |
| **Bêteşe** | (n.dar.mê) Gotin û kiryarên sivik û bê hizir ko civatê hêris di ke. |

| | |
|---|---|
| **Bêtêhn** | (hn.l.çewa) Giyan yan amêrê têhn têda tunebe. Germî tê nebit. Bêcan. Mirî. |
| **Bêtêl** | (hn.l.çewa) Amêrên bê têle kar dikin, mîna têlefon, kompiyûter, û htd. |
| **Bêtir** | (pêrb) Alavê zêdekirinê. Pitir. Zêdetir. |
| **Bêtirîn** | (pêrb) Pitirîn. Ji hemûyan zêdetir. |
| **Bêtirs** | (hn.l.çewa) Meriv karekî bi ke û netirse. Netirsan. |
| **Bêv** | (n.x.mê) Tora girtina masîyan ji çeperên darî hatîye diristkirin. Sîte. Sulte. |
| **Bêvankes** | (n.nediyar.dar) Li cihê navî bikar dihêt. Kesek nediyar. |
| **Bêvên** | (hk.dar.çewa) Bêgêwil. |
| **Bêvil** | (n.x.mê) Kepî(difin) kunên difinê . ximximk. |
| **Bêwar** | (hk,hn.n.l.dz,.çewa) 1. Bêmal. Bêcih. Bêxanî. 2. Navê mêrane. |
| **Bêwexer** | (hk.l.çewa) Kur(khur). Beş. |
| **Bêwic** | (hn.l.çewa) Bikêrnehatî. Bêkêr. Bêmifa. |
| **Bêwijdan** | (hn.l.çewa) Dilreq. Bêdil. |
| **Bêx** | (n.x.mê) Rih. Bêxên didanî. Rihên didanî. |
| **Bêxêr** | (hn.l.çewa) Kêrnehatî. Bêkêr. |
| **Bêxîret** | (hn.l.çewa) Tembel. Gemşo. Gemjo. |
| **Bêxîretî** | (n.l.mê) Xîret nekirin. Tembelî.: Ew ji bêxîretî na here xwendingehê. |
| **Bêxudan** | (hn.l.çewa) Mirovê kesên wî tunebe. Bêkes. Bêxwedî.bêsemyan. |
| **Bêxudanî** | (n.l.mê) Nebûna xudanî. : Baxê me ji bêxudanî hişk bû. |
| **Bêxwedî** | (hn.l.çewa) Bêxudan. |
| **Bêxwê** | (hn.l.çewa) 1. Xwarina xwê dinav de tunebe.2. Mirovê bêxwê, ang ; mirovê sist û xav. : Ev zade yê bê xwê ye. Girara bêxwê. |
| **Bêxwîn** | (hn.l.çewa) Xwîn di leşî da tune. Candarên bêxwîn. |
| **Bêxwînî** | (n.l.mê) Nebûna xwînê. Kêmxwînî. |
| **Bêxwînman** | (k.jn.gl.mê) Xwîn di laşî de neman. (K) bn : Man. |
| **Bêy** | (alv.pêvgir) Ne dige. Ne pêra. Tunebe. Bêy te ez naçim. Brx Digel. Pêra. Bê. |
| **Bêz** | (n.x.mê) Dilreş (tiştê) pîs ,gemar. |
| **Bêzar** | (hn.l.çewa) 1. Bê ezman. Nezan. 2.Hêris. Tengav. |
| **Bêzarbûn** | (k.jn.gl.mê) Hêrisbûn. Tengavbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Bêzarî** | (n.l.mê) Tengasî. Hêrisbûn. |
| **Bêzarkirin** | (kjn.gl.mê) Hêriskirin. Tengavkirin. Torekirin. (K) bn: Kirin. |
| **Bêzever** | (hn.l.çewa) Bêzirav. Kulafe. Kulekfireh. |
| **Bêzirav** | (hn.l.çewa) Tirsonek. Kulafe. Kulekfireh. |
| **Bêziravî** | (n.l.mê) Kulekfirehî. |
| **Bi** | (Pêrb, alv.pêvgir) 1.Digel. : Ez bi dil û can bi te ra me. Bi hevre .2. Pêşpirta kiryarê.bi ke. Bi xwe. Bi zanin. Bi dîta. 3. Pêşpirtê pesinnavan. Bi hîvî. Bi bawerî, … 4.Pêşpirta sûndxwarinê.Bi gora nemiran. :Bi xudê. |
| **Biçkov** | (n.dar.mê) Bişkov. |
| **Biçûk** | (hn.x.çewa) Tiştê hûr. Ne gir. Ne mazin. : Xanîyê biçûk. Mirovê biçûk. Gundê biçûk. |

| | |
|---|---|
| **Biçûkatî** | biçîkatî (n.dar.mê) Dema jîyê zarokînî yê. Her ji biçûkatîya xwe min hez ji xandinê di kir. |
| **Biçûkbûn** | (k.jn.l.mê) Kinbûn. Hûrbûn .Têkçûn. Gundê me sal bo salê biçûk di bit. (K) bn : Bûn. |
| **Biçûkkirin** | (k.jn.l.mê) 1. Dema mirov qebarê tiştekî kêm bi kit. Me baxçeyê mala xwe biçûk kir. 2. Nazikkirin. Nazandin. Jîyê xwe kêmkirin. : Ev jine çend xwe biçûk di ke. |
| **Bigoman** | (hn.dar.çewa) Tiştê goman têda hebe. Ne sedased. :Ew bi goman li karê me di nêrit. |
| **Bigor** | (n.dar.mê) Amêrê kontirolkirina têhina karebê. |
| **Bigoşt** | (hn.dar.çewa) Têrgoşt. Qelew. |
| **Biha** | (n.x.nêr) 1 Nirx, nirxe. 2 Hêja. Pîroz. : Bihayê kîloyeka sêvan çende ?. |
| **Bihagiran** | (hn.l.çewa) Pir hêja bi biha. Giranbiha. : Hevalê bihagiran. |
| **Bihaname** | (n.l.mê) Kaxeza bihayên mitayî û kelûpelan liser hatîye nivêsîn. |
| **Bihar** | (hkdem.x.mê) Werzekê salê yê xweşe dema hişîn(şîn)bûna gîya û darane, ji mehên avdar, nîsan û gulan an pêk dihêt.Pend :Biharan di de ber dilê xwe. Ang ; kesê ji xwera tiştan xweş û sanahî di ke. |
| **Biharanavîn** | (n.l.mê) Meha nîsanî. |
| **Biharapaşîn** | (n.l.mê) Meha gulanê. |
| **Biharapêşîn** | (n.l.mê) Meha adarê. |
| **Biharat** | (n.dar.mê) Arê giyayê tam û bêhin xweş di kin nav xwarinan da. :Karî, bîber, gijnîj, catirk û htd biharatin. |
| **Bihare** | (n.dar.mê) Genimê li biharê jibo di behit û jibo dirûnê yê berheve. |
| **Bihêl** | (n.dar.mê) Kaxez, yan karta destûrî ya çûne jor ,pişkarîkirin di çalakîyan da. Bihêla ; ahingê, sînemayê, pîşangehê û htd. Te bihêl nebit, nabit tu bi çî ahengê. :Bihayê her bihêleka yarîya topanê, deh dînarin. |
| **Bihêz** | (hn.dar.çewa) Xwedî zendûbaz. Zeberdest. Hêzdar. : Hespê han pir bihêze, dikare çarsed kg bi hilgire. |
| **Bihişt** | (n.x.mê) Beheşt. |
| **Bihîstin** | (k.jn.x.mê) Hestkirina dengan bi rêya guhan. Guhlêbûn. Gulêbûn. Bîstin. : Te bihîstîye kurê Sêvdînî jin ji xwere xwaztîye ?. (K) bdn : ez di bihîzim em di bihîzîn, tu di bihîzî hûn di bihîzin, ew di bihîze[…it] ewan di bihîzin. Pr : dê[bi] +bdn. Bdb : di bihîst, di bihîstin. Db,dûr. Bihûstibû, …. Bûn. (F) : bi bihîze, bi bihîzin. |
| **Bihîstok** | (n.dar.mê) Têlefon. |
| **Bihnok** | (n.dar.mê) Bêhnok.[,] |
| **Bihojandin** | (k.jn.dar.mê) Heladin. :Rûn liser agirî bihojand. :Bi bihojînin, di bihojand, dê bi bihojîne, bihojandibû, . |
| **Bihojîn** | (k.jn.x.mê) Helan. Helyan. :Qerîse jiber germa tavê bihojî. |
| **Bihok** | (n.x.mê) Bîh. |
| **Bihûrbijar** | (hn.l.çewa) Kesê hûrik hizir dike. Kesê barê wî giran û xema her tiştî di xwe. Xemxor. |

| | |
|---|---|
| **Bij** | (n.x.mê) 1.Heza mirovî jibo xwarinê. Gêwil. Vîyan. : Ev meheke bija min jibo xwarinê pir kêm bûye. : Ez xwarinêd tîj di xwem dako bija min ve bi be. 2. Gîyan. Can. |
| **Bijandin** | (k.jn.x.mê) 1.Belavkirina nûçeyan liser xelik, hendaman. Belavkirin. Reşandin. 2. Pir ji xwarinê hezkirin. Ji dil vîyan. Jibo dînbûn. Pijandin. (K) bdn :Ez di bijînim em di bijînîn, tu di bijînî hûn di bijînin, ew dibijîne […it] ewan dibijînin. Pr: dê bi +bdn. Bdb: di bijand, di bijandin. Db,dûr : bijandibû. …..bûn. (F): bi bijîne bi bibijînin. |
| **Bijang** | (n.x.pir) Mijîlank. |
| **Bijar** | (hn.dar.çewa) 1. Tiştê di nav birekê ji hemûyan geş û ciwan tir. Bijare. 2. Bi hejarî. Bi jarî. : Daykê zarokê xwe bijarî xwedî kir. 3 .Navê mêrane. |
| **Bijare** | (hn.dar.çewa) Mirov, candar,mita, cil û htd yê ji hemûyan baş û xwe!iktir. Serpişk. Bijar. |
| **Bijarte** | (hn.dar.çewa) Bijare. |
| **Bijartin** | (k.jn.x.mê) Ti!tê ba! û xirab jihev cudakirin. paqijkirn.:Daykê danê savarî bijar û pa!î lêna. (K) bdn: ez dibijêrim em dibijêrîn, tu dibijêrî hûn dibijêrin, ew dibijêre[…it] ewan dibijêrin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di bijart, di bijartin. Db,dûr : bijartibû, …bûn. (F):bi bijêre bi bijêrin. |
| **Bijartî** | (hn.dar.çewa) Yê hatî bijartin. Xwarina bijartî. |
| **Bijikandin** | (k.jn.dar.mê) Mirov ti!tekî belav bi ke. Parçe bi ket. Bipirtikînit. :êkî cama pencera me bijikand. (K) bdn : ez dibijikînim em di bijikînîn, tu dibijikînî hûn di bijikînin, ew dibijikîne[…it] ewan di bijikînin. Pr : dê[bi] + bdn. Bdb : dibijikand, di bijikandin. Db,dûr: bijikandibû, …bûn. (F): bibijikîne, bi bijikînin. |
| **Bijikî** | (hk.dar.çewa) Jikestî. Peritî. Pirtikî. |
| **Bijikîn** | (k.jn.x.mê) Belavbûn. Pirtikîn. : Demhijmêr kevt û bijikî. |
| **Bijî** | (fermana. jiyan) Daxaza jîyek dirêj jibo yekî bi kin. Desxweşî lê kirin.Aferîn. :Bijî Kurdistan. |
| **Bijîn** | (hn.da.çewa) 1. Pakij. Pak. Jaravkirî. Amanên bijîn. 2. Hezkirina xwarinê. Bij. 3. Sax. Zindî. Çeleng. Jîndar. |
| **Bijînbûn** | (k.jn.gl.mê) 1.Paqijbûn. Bi giyan kevtin. 2.Zaxbûn. Peytbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Bijînkirin** | (k.jn.gl.mê) 1. Pakijkirin. Jaravkirin.2. Zaxkirin. Peytkirin. Destan bijîn ke. (K) bn: Kirin. |
| **Bijînkirî** | (hk.l.çewa) Paqijkirî. |
| **Bijîr** | (hn.dar.çewa) Mirovê zîrek û hoşmend. Zanebûn. Jîrane. |
| **Bijkoj** | (n.dar.mê) 1. Pişkovk. 2. Navê keçane. |
| **Bijûn** | (hn.x.çewa) 1. Xweş. Peyt. Leşsax. 2. Biber. Berdar. |
| **Bijûnbûn** | (k.jn.l.mê) Pakijbûn. Saxlembûn. (K) bn: Bûn. |
| **Bijûnkirin** | (k.jn.lmê) bijînkirin. Pakijkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Bikaranîn** | (k.jn.gl.mê) Weke meriv tiştek, amêrek, makînek ê karî têda bi ke, yan pê bi ke. Karpêkirin. :Ezê tirombêla xwe jibo şahîyê bi kar bînim.(K) bn: Anîn. |
| **Bikarînan** | (k.jn.gl.mê) Bikaranîn. |
| **Bikêr** | (hn.dar.çewa) Merivê hêja, peyt, çeleng. Tiştê qenc. |

| | |
|---|---|
| **Bikêrhatin** | (k.jn.gl.mê) Dema mirov yan kelûpel jibo xwe û civakê yê zana û peyt be. Ji hejî cihê lê kar di ke. :Ew pêlav bi kêr pîyên te na hêt. (K) bn: Hatin. |
| **Bikêrhatî** | (hn.l.çewa) Mirovê di kare bi çakî kar û serederîyê bi ke. Peyt. Hejî. : Xortekê bi kêrhatî ye. |
| **Bikok** | (hn.dar.çewa) Peyt. Zivt. Çeleng. Kok. |
| **Bikoranî** | (hn.dar.çewa) Mirov karekî bê hizir darijtin bike. Bikoretî. |
| **Bikoretî** | (hn.dar.çewa) Bikoranî. |
| **Bikirk** | (n.dar.mê) Binê bîr, kanî, çal, aman an û htd. |
| **Bil** | (pêrb) Alaveke jibo ji nav girtin û vederkirinê, bi kar di hînin. ne ev, lê yek din. Ji bil. Ji bilî. Eve ne, yê/ya dî. : Dergeh jibo her kesê vekirîye ji bil zarokan. : Ez hemû zadan di xwem ji bil savarê. |
| **Bila** | (pêrb) rêzman Alaveke jibo pejirandin û qayîlbûn li ser biryarek, gotin yan daxwazekê.Başe. Qeydî nake. Xem nake. :Bila ez di gel hewe bi hêm?. Pend :Bila rê bit, bila dûr bit, bila kiç bit, bila pîr bit. |
| **Bilandin** | (k.jn.dar.mê) Hawî_kirin. Tenakirin. Bêdengkirin. Kêmkirin. Têlefizyona xwe bi bilîne, ezê di xwînim. Zarok bilandin. Di viya min zarok bi bilanda.(bilandiba). (K) bdn: ez di bilînim em di bilînîn, tu di bilnîî hûn di bilînin, ew di bilîne[..it] ewan di bilînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di biland, di bilandin. Db,dûr : bilandibû, ….bûn. (F) : bi bilîne, bi bilînin. |
| **Bilav** | (hn.x.çewa) Belav. |
| **Bilbil** | (n.dar.nêr) balinde Çeçikeka ciwan û deng xweşe, bi awazên dilînî di stire. Nîşana evîndarîyê. |
| **Bildirik** | (n.dar.mê) Dar û tiraşên bi stirî. Dirî. |
| **Bilez** | (hn.dar.çewa) Kiryara di vê zû bi hêt kirin. Lezgîn. Çima tu weha yê bilezî?. Pend gotina xesoyan :Min bûkek îna bilez û bez, sivika malê bûme ez. |
| **Bilêt** | (n.x.mê) Karta bihêlîyê. Bihêl. |
| **Bilind** | (hn.x.çewa) 1. Tiştê ji erdî dûr, li serî. Berz. Evraz. Esmanê bilind. Dareka bilind. Çiyayên bilind. Bejin a bilind. Pend :Yê bilind bi firit, dê nizim bi erdî kevit. Ang; kesê xwe mezin bi ke û kesên li dora xwe kê bi bîne, dê rastî çaman bi be. 2. Navê mêrane. Brx Nizim. |
| **Bilindahî** | (n.dar.mê) Bilindî. : Bilindahîya spîndarê bît gezin. |
| **Bilindayî** | (n.dar.mê) Bilindî. |
| **Bilindbêj** | (hk.l.çewa) Dengbilind. |
| **Bilindbûn** | (k.jn.l.mê) Ber bi evraz ve çûn. Jêhelçûn. Bibakevtin. Bay li kaxezêda, bilind bû. (K) bn: Bûn. |
| **Bilinddek** | (n.dar.mê) rêzman. Cihê selîqa dengî bilind dibe di peyvê da (^). : Mînak: dengê mirovî li birgeha (tan) ji peyva Kurdistan bilind dibe.ango bilindek di keve tan. |
| **Bilindî** | (n.dar.mê) Tişt yan cihêd bilind. Evrazî. : Ew ji bilindîya deh gavan kevte xwar. |
| **Bilindîne** | (hn.dar.çewa) Giring. |

| | |
|---|---|
| **Bilindkirin** | (k.jn.l.mê) Ber bi evraz ve birin, avêtin. Berzkirin..: Mamostay gote xwendekaran; yê bersiva pisyara min bizane, bila destê xwe bilind ke. Dengê xwe bilind ne ke!. (K) bn: Kirin. |
| **Bilindkirî** | (hk.l.çewa) Hatî bilind kirin. |
| **Bilî** | (pêrb) rêzman Alaveke jibo jêgirtin û neyîkirina tiştekî ji birekê. Ji bilî. Bilî.Heger ne. |
| **Bilîl** | (n.x.mê) mûzîk Amêrekê mûzîkê ye du lûlî ye bi pifkirinê deng jê der dikevit. Bilûr. |
| **Bilîlbêj** | (pîşn.l.dz) Bilîlvan. Bilûrvan. |
| **Bilîlbêjî** | (karn.l.mê) Karê gotin û pifkirina bilûrê. |
| **Bilîlvan** | (pîşn.dar.dz) yê bilîlê lê dixe. Bilîlbêj. Bilûrvan. |
| **Bilîvanî** | (karn.dar.mê) Bilîlbêjî. |
| **Bilîmet** | (nh.x.çewa) Bevil. |
| **Bilo 1** | (n.x.mê) Tevinpîrk. Pîrik. |
| **Bilo 2** | (n.x.nêr) 1. Bilind. Bel. 2. Hedamê guhnelî yê nêr.Kîr. |
| **Bilok** | (n.x.mê) Libneyêd avakirina dîwaran. Libne. |
| **Biloq** | (hn.x.çewa) Bel. Derkevtî. Zîq. Gir. : Çavêd biloq. |
| **Bilot** | (hn.x.çewa) Bilind. Serevraz. : Paşîya bilot. |
| **Bilotbûn** | (k.jn.l.mê) Bilindbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Bilotkirin** | (k.jn.l.mê) Bilindkirin. Brlkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Bilq** | (n.x.mê) 1. Pêqîşkêd bayî ji nava avê derdikevin.2. Dema şileyek[av, xwîn, zad û htd] bi gor der diçe. |
| **Bilqhavêjtin** | (k.jn.l.mê) Derkevtina bilqan. . :Kanî ya bilqan di havêje. (K) bn: Havêjtin. |
| **Bilqok** | (n.dar.mê) Bilq. |
| **Bilûr** | (nx.mê) bn :Bilîl. |
| **Bilûrjen** | (pîşn.dar.dz) Bilûrvan. |
| **Bilûrjenîn** | (k.jn.l.mê) Bilûrkutan. Bilûrlêdan. (K) : Jenîn. |
| **Bilûrkutan** | (k.jn.l.mê) Wekî mirov li bilûrê dixe. |
| **Bilûrlêdan** | (k.jn.l.mê) Lêdana bilûrê. Bilûrjenîn. (K) bn: Lêdan. |
| **Bilûrvan** | (pîşn.dar.dz) bn : Bilîlvan. |
| **Bin** | (hkc.nnr) 1.Pişka xarê ya tiştî. Alê binî yê dîwarî. 2.Cihê tişt xwe liser digirin. Binê, pê, xanî, amanan, derayn û htd :Ez li bin darê nivistim.. Brx Ser. |
| **Binaçe** | (n.dar.mê) Binemal. Nivş. Berebab. |
| **Binanûxwê** | (hn.gl.çewa) Wefadar. :…, mirovkeê bi nanûxwê ye û çi caran dostên xwe ji bîr nake. |
| **Binar** | (n.dar.nêr) 1. Arê di keve binê gonîyan. 2. Bingeh. Jengiste. |
| **Binas** | (n.x.pir) Sûç. Guneh. :Binasên tene, evro em gîro bûn. |
| **Binaskar** | (hn.l.çewa) Sûçbar. Gunehkar. |
| **Binaskarkirirn** | (k.jn.gl.mê) Gunehbarkirin. :Jiber wî bûyera xirab gelek kes hatin binaskar kirin. (K) bn :Kirin. |
| **Binaskarî** | (hk.l.çewa) Gunehbarî. Sûçbarî. |
| **Binaş** | (n.l.mê) Bingeh. Binaxe. Jengiste. |

| | |
|---|---|
| **Binav 1** | (n.l.mê) Binê avê. |
| **Binav 2** | (hn.dar.çewa) 1.Navkirî. Yê ko nav heye.2. Navê wî di nava xelkî de belave. Binavdeng. |
| **Binavbûn** | (k.jn.gl.mê) Kevtin binê avê. Niqobûn. :Cerik binav bû. (K) bn: Bûn. |
| **Binavdeng** | (hn.l.çewa) Merivek bi nave. Sernas. Bernas. |
| **Binavdengbûn** | (k.jn.gl.mê) Binavdengkevtin.: Eve ji kengî ew hosa binavdeng bû. bn: (K). Bûn |
| **Binavdengkevtin** | (k.jn.gl.mê) Navdengê wî/wê di nav xelkî da belav bûye. (K) bn: Kevtin. |
| **Binavkanê** | (n.l.mê) Lîztineke mirov hevdu di bin avê ve di kin. |
| **Binavkanêkirin** | (k.jn.gl.mê) Hevdu di bin avê ve kirin. : Were ez û tu binavkanê bi kin!. (K) bn:Kirin. |
| **Binavkirin 1** | (k.jn.gl.mê) Nav danîn ser kes, tişt yan candarekî. Nav lê kirin. |
| **Binavkirin 2** | (k.jn.gl.mê) Xistin bin avê. Hevdu êxistin bin avê. Niqokirin. Min xwe di bin avê ve kir. Hevdijî xwe binav kir. (K) bn : Kirin. |
| **Binavûdeng** | (hn.gl.çewa) Binavdeng. |
| **Binax** | (n.l.mê) Binê axê. Di bin axê de. Kûrayî. Bingeh. |
| **Binaxbûn** | (k.jn.gl.mê) Man di bin axê da. Ax kevt ser. (K) bn: Bûn. |
| **Binaxe** | (n.dar.mê) Bingeh. |
| **Binaxkirin** | (k.jn.gl.mê) Mirov tiştekî bi ke bin axê. Ax radan ser. Veşerin. : Mirîyêd xwe binax kirin. (K) bn : Kirin. |
| **Binba** | (hn.l.çewa) 1. Tiştê pir sivik.2. Corek ardê sipîye. |
| **Binbal** | (n.l.nêr) Binkefş. Binhingil. |
| **Binbir** | (hn.dar.çewa) Wêran.Vebir. |
| **Binbirbûn** | (k.jn.gl.mê) Bi êkcarî jinav hatî birin. Wêranbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Binbirkirin** | (k.jn.gl.mê) Bi êkcarî jinav birin. Nehêlan.Qirkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Binc** | (n.x.mê) Jajî. Rêçal. |
| **Bincilik** | (n.l.mê) Kiraskên mirov li ben cilan li ber xwe di ke. Fanêle. |
| **Bincî** | (n.l.mê) Doşek. Nalîk. |
| **Binçav** | (hk.l.çewa) 1. Kesê li bin zêrevanîyê be. 2. Zîha binî ya çavî. |
| **Binçavkirin** | (k.jn.gl.mê) Xistine bin çavan. Zêrevanî lê kirin. (K) bn: Kirin. |
| **Binçavkirî** | (hk.l.çewa) Kesê di bin çav û nêrînê da. |
| **Binçeng** | (n.l.pnêr) Binkefş. Binşaper. |
| **Binçenganê** | (n.l.mê) Xwelêkdan. : Du zarokan binçenganê di kirin. |
| **Binçîne** | (n.l.mê) Bingeh. Binaş. Binaxe. |
| **Binçok** | (n.l.nêr) Cihek çale di kevit bin çokî. |
| **Bindank** | (n.l.mê) Danê di keve binê amanan. Hûrikê savarî. |
| **Bindar** | (n.l.mê) Siha darê. Sîbera darê. 2. Jina şûkirî. Jina mêrkirî. |
| **Bindeq** | (n.x.mê) Coreke çerezên dindik xire. |
| **Bindest** | (hn.l.çewa) Mirovê li bin destê yekî. Mirovê ne serbest. Girêdayî. Girtî. Ne azad. |
| **Bindestbûn** | (k.jn.gl.mê) Meriv di keve bin destê alî, yan kesekî. :Ta kengî em dê bindest bîn ?. (K) bn : Bûn. |

| | |
|---|---|
| **Bindestî** | (n.l.mê) Jiyana bin destê dagîkeran. Jiyana ne azadî. :Bindestî derde. |
| **Bindestkirin** | (k.jn.gl.mê) Tepeserkirin. Dagîrkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Bindestkirî** | (hk.l.çewa) Binçavkirî. Tepeserkirî. |
| **Bindok** | (n.l.mê) Rûnê di keve binê amanan. binê rûnî. |
| **Binecih** | (hn.l.çewa,hk.cih) 1.Peyt. Neliv. Rêkûpêk.2. Xwecih. Rûniştî. |
| **Binecihbûn** | (k.jn.l.mê) Akincîbûn. Rûniştin. :Em hêjta binecih ne bûne.(K): bn. Bûn. |
| **Binecihî** | (l.dar.mê) 1. Cihê jê hatê .kûk.2. Cihê mirov lê akincî dibit. |
| **Binecihkirin** | (k.jn.l.mê) 1. Serûberkirin.rêkxistin. 2. Xwecihkirin.:Piçek xwe binecih bi kin di dû ra em dê herin. (K): bn Kirin. |
| **Binecihkirî** | (hk.l.çewa) Peytkirî. Hatî binecihkirin. |
| **Binecîh** | (hn.l.çewa,hk) bn :Binecih. |
| **Binefş** | (n.x.mê) 1. gul Corekê gulane, pir rengên wan hene. 2. Navê jinane. |
| **Binefşî** | (hn.dar.çewa) Rengê mûr. |
| **Binegeh** | (n.dar.mê) Bingeh. Binecih. |
| **Binekarî** | (n.dar.mê) Karê binvebinve. Xapandin. Di serdabirin. Fêl. |
| **Binemal** | (n.dar.mê) Malbat. Babik. Nivş. : Ew ji binemaleka kurdperwer bû. |
| **Binerd** | (hk.l.cih) Cihê li bin erdî. Tiştê bin erdî, axê. : Sêva bin erdî. |
| **Binerdbûn** | (k.jn.gl.mê) Tişkê di keve bin erdî. Binaxbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Binerdik** | (n.l.mê) Sêvbinerd. |
| **Binerdîn** | (hk.l.cih) Cihên kunkirî mîna rêyan di bin erdî ve. |
| **Binerdkirin** | (k.jn.gl.mê) Tiştê mirov bêxe bin erdî. Meriv axê bike ser tiştekî. : Cotyaran tov binerd kirin. (K) bn: Kirin. |
| **Binerdkirî** | (hk.l.çewa) Êxistî bin erdî. Verşarî.:Ev pitate ya binerd kirî ye. |
| **Binetar** | (n.dar.mê) Bingeh. |
| **Binevş** | (nl.mê) gul 1. Corek gulane(kulîl)a .2. Navê jinane. Binefş. |
| **Binêsk** | (n.dar.mê) Pirta dawîyê ya biçûk ya jiber sabûnê di mîne. |
| **Binêşt** | (n.x.nêr) Benîşt. |
| **Bingeh** | (n.l.nêr) 1.Destpêka danana her tiştekî. Jengiste.Binetar. 2. Navend. Bingehê ronakbîrî. |
| **Bingehavêtin** | (k.jn.gl.mê) Pêngavhavêtin jibo avakirina bingehekî. Damezrandin. (K) bn:Avêtin. |
| **Bingehdanîn** | (k.jn.gl.mê) Avakirin. Dana bingehî. Pêngavhavêtin.Danana şengisteyan, (K) Danîn. |
| **Bingehgirtin** | (k.jn.gl.mê) Binecihbûn. Xwecihbûn. Rûniştin. (K) bn: girtin [em bingeh digirin].. |
| **Bingehîn** | (hn.l.çewa) Tiştê, gotina bingehî. Giring. Serekî. Serpişk. |
| **Bingehziman** | (n.l.mê) Rêzman. Bingeha, kûka ziman. |
| **Bingelte** | (hn.l.çewa) Merivê pir hej ji henekan di ke û axivtin şirîn. Tiraneker. Yarîker. |
| **Bingelteyî** | (n.l.mê) Tirane. |
| **Binharî** | (hn.dar.çewa) bi nîharî, Mirovê jiber mirina xweş divîyekî cilên reş li xwe di ke. Bi Jînî. |
| **Binhingil** | (n.l.nêr) Binkefş.Binbal. Binçeng. |

| | |
|---|---|
| **Binik** | (n.dar.nêr) Binê tiştên biçûk, binik ê cigarê, binik ê qelemî û htd. |
| **Binî** | (hk.cih) 1. Xwarê. Alîyê jêrî. 2. Bin. Binik. 3. Pinî. Tewil. |
| **Binîdanîn** | (k.jn.l.mê) Avakirin. Damezrandin. Bingeh jêre danîn.(K) bn: Danîn. |
| **Binîgirtin** | (k.jn.l.mê) Weke xwarinek binê amanî digire. (K) bn: Girtin. |
| **Binîkirin** | (k.jn.l.mê) Pinîkirin. Pêlav binîkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Binîkişandin** | (k.jn.gl.mê) Ji destan wergirtin. Ji destan deranîn. (K) bn: Kişandin. |
| **Binîkolan** | (k.jn.l.mê) Xapandin. Di serdabirin. Axivtin jê çêkirin. Vekolîn. (K) bn : Kolan. |
| **Binîşewat** | (n.l.mê) Binvereng. Binîşewata îpraxan pir xweşe. |
| **Binîşewitîn** | (k.jn.gl.mê) Dema zad bi binê qazanê ve di şewite. (K) bn: şewitîn. |
| **Binkask** | (nl.mê) Kasika digel peyalê, yaku peyala çayê liser dadinin. Kasik. |
| **Binkefş** | (n.l.nêr) Cîyê di kevit bin bask û sermilêd mirovî yê mû lê di hêt. Binhingil. Pend :Bikefşêd wî di xurin.ang; di xwazit kiryareka seyr bi ke. |
| **Binkêl** | (n.dar.nêr) Binkefş. |
| **Binkirask** | (n.l.nêr) Kirasê di bin cilikan di ken ber xwe. Binkiraskê sipî. Binkiraskê wî yê vebûy. |
| **Binkol** | (n.dar.nêr) Xermaşe. |
| **Binpê** | (n.l.mê) 1.Binê pêyî. Panka pêyî. 2. Mehsika pêlavê. |
| **Binpêbûn** | (k.jn.gl.mê) Kevtin bin pêyan. |
| **Binpêkirin** | (k.jn.gl.mê) Jêlîkirin. Bêrêzkirin. Bêrûmetkirin. Kirêtkirin. :Mafên welatîyan binpê di ken. Biyara babê xwe binpê kir. (K) bn: Kirin. |
| **Binpêkirî** | (hk.l.çewa) Xistin bin pêyan. Bêrûmet. |
| **Binrex** | (n.dar.mê) Doşek. Nalîk. : Liser binrexê xwe dirêj kir. Binrexa dumêre. |
| **Binta** | (n.l.mê) 1. Bingeh. Jengiste. 2. Tûtina ta digel. Tûtina kate. |
| **Bintatî** | (n.dar.nêr) Corek tirîye. Tirî. |
| **Binvebinve** | (hn.l.çewa) Mirovê bêdeng û kêm axivtin dîyar, lê di binve gelek yê bi kenî û gotin xweşe.Yan mirovê xwedî find û fêl. |
| **Binzik** | (n.l.mê) candar Parçeyeke di keve binê zikî. |
| **Binzînk** | (n.l.nêr) Tûrk yan kulavê di keve binê zînê liser pişta dewaran. |
| **Bir** | (n.x.mê) 1. Deste. Revde. :Bira kewan. Bireka mirovan. 2. Dema derbaz, kiryara birin. |
| **Bira** | (n.x.nêr) 1.Kurên daybabêd mirovî. 2. Jibo rûmetê di bêjin hevdu. |
| **Birader** | (.n.dar.dz) Heval. Hevrê. Hevkar. Niyas. Bira. |
| **Biraderi** | (biraderînî) . Hevalî. Hevalînî.Biraynî. |
| **Birajtin** | (k.jn.x.mê) Xwarin liser agir danan, yan di nava pelan da, bêy av û rûn, tanî bikêr xwarinê bêt. Goşt birajtin, hêk birajtin. (K) bdn: ez dibirêjim em dibirêjîn, tu dibirêjî hûn dibirêjin, ew dibirêje[…it] ewan dibirêjin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di birajt, di birajtin. Db,dûr : birajtibû, …bûn. (F): bi birêje, bi birêjin. |
| **Birale** | (n.dar.mê) Nemamk. Jitil. |
| **Biramak** | (n.l.nêr) Birayê ji daykê. Birayê şîrî. |
| **Biraştin** | (k.jn.x.mê) Birajtin. |
| **Biratî** | (n.dar.mê) Biraynî. |

| | |
|---|---|
| **Birayane** | (hk.dar.çewa) Serederî û bi hevre jîyana mîna birayan. |
| **Birayetî** | (n.dar.mê) 1. Hevalînî. Barayî. 2. Rojnameyeka rojaneye zimanhalê PDK. |
| **Birayî** | (n.dar.mê) 1. Birayêd hevdu.2. Hevra kar kirin wek bira, bi dilsojî. Dilsaxî. |
| **Biraza** | (n.dar.nê) Kurê bira yê mirovî. Pisbira.: Azad birazayê mine. |
| **Birazava** | (n.l.nêr) Keseke li demê şahîyê hertim bi zavayî ra ye, jibo xizmeta wî bi ke û şîretan bi dê. |
| **Birazî** | (n.dar.nêr) Biraza. Kurbira. |
| **Birbend** | (n.dar.mê) Dolab. Refik. Kendor. |
| **Birbir** | (hk.l.çewa) 1.Komkom. Destedeste. : Kew birbir firîn. Destedeste firîn.2. Zîvik a pişta mirov û candaran. |
| **Birbire** | (n.dar.mê) 1.Birbir. 2. Zîvik. |
| **Birc** | (n.x.mê) Avayîyê bilin û asê jibo zêrevanîyê bi kar di hêt. |
| **Bircabelek** | (n.l.mê) Kevine birca wargehê mîran, li Cizîra Botan. |
| **Birçî** | (hn.x.çewa) Hestkirina candaran ko pêdvî bi xwarinê heye.Birsî. :Ez birçî me. |
| **Birçîbûn** | (k.jn.l.mê) Dema giyandar birçî di bin. Pêdvî xwarinê dibin. Birsîbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Birçîkirin** | (k.jn.l.mê) Ne xwarina zadî, ne dana zadî.zahidkirin. : Xwe birçî kir ang; zû zad ne xwar. (K) bn: Kirin. |
| **Birçîkirî** | (hk.l.çewa) Birçî hiştin. Hêlan birsî. |
| **Birçîtî** | (n.dar.mê) Dema xwarin nemîne yan kê di be. Qetlazî. Derdê dirçîbûnê. Birsîtî. Kulb. :Heger baran ne bare, dê birçîtî li welatê me peyda bibe. |
| **Birek** | (n.dar.nêr) Alavekê asinîne pan û tenike, didankên tîj hene jibo birîna daran û tiştên din bikar di hêt. Mişar. |
| **Birekkirin** | (k.jn.l.mê) Birîna daran bi birekî. Mişarkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Birêz** | (hn.dar.çewa) Rêzdar. Birûmet. |
| **Birgeh** | (n.dar.mê) rêzman Cihê birînê. Cihê vebirînê. Cihê rawestanê.cihê hevgirtina gehan. : Peyva Kurdistan ji sê birgehan pêk di hêt; kur - dis - tan. |
| **Birh** | (n.x.mê) Birû. |
| **Birik** | (n.x.mê) Bayekê bêhin nexweşe paş zadxwarinê ji devê mirovî der di keve.Qirp. |
| **Birikhatin** | (k.jn.l.mê) Derkevtina birikan ji devî. : Birik di hêne min. Birikên min di hên. (K) bn :Hatin. |
| **Birikîn** | (k.jn.x.mê) Birikhatin. (K)ez di birikim em di birikî, tu di birikî hûn di birikin, ew di birike ewan di birikn. (F): bi birike, bi birikin. |
| **Birin** | (k.jn.x.mê) Veguhastin ji cihek bo yê dî. Livandin. Bizizandin. (K) bdn: ez di bim,em di bîn,tu di bî hûn di bin. ew di be[…et] ewan di bin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di bir, di birin. Db,dûr : biribû, …bûn. (F) bi be, bi bin (bi ben). |
| **Birinc** | (n.x.mê) 1.Danek çandinî sipî û ciwane. 2. Xwarinek xweş û bi tame. |
| **Birincî** | (hk.çewa,pn.x.dz) 1. Wek birincî ciwan. 2. Bijare. |
| **Birincok** | (hn.dar.çewa) Tiştê ron, yê meriv ronahîyê têra di bîne.Ron. |
| **Biriskîn** | (k.jn.x.mê) Teysîn. : Cilik di biriskin. |
| **Birî** | (n.x.mê) 1. Birû. 2. Xwe givaştina meriv û candarên mê dema zanê. |

| | |
|---|---|
| **Birîkar** | (pîşn.dar.dz) Kesê karên êkî bi stoyê xweve di girit û serderîyê bi karên wî di ke. Cihgir. |
| **Birîkarî** | (karn.l.mê) Kareke di hêt kirin navbera kesanda ko êk di hêt destnîşankirin jibo bikarên wî rabibe . Cihni_an. |
| **Birîkarîyagiştî** | (n.l.mê) Birîkarîya hemû mal û karî di hêt kirin. |
| **Birîkarîyanemaz e** | (nl.dz) Birîkarîyeke tenê jibo karek nemazeye. |
| **Birîkarname** | (n.l.mê) Nameyeka yan formeke bi îmza birîkar û dîdvanan hatîye berhevkirin. |
| **Birîkirin** | (k.jn.l.mê) Xwe givaştin li dema zanê. :Bizin ya birîyan di ke wesa diyare dê zêt. (K) bn : Kirin. |
| **Birîn 1** | (k.jn.x.mê) Dukerkirina tiştî.Jêvekirin.:Dar birîn. :Ser birîn. (K) bdn : ez di birim em di birîn, tu di birî hûn di birin, ew di bire[…it] ewan di birin. Pr : dê [bi] + bdn. Bdb : di birî, di birîn. Db,dûr : birîbû, … bûn. (F) : bi bire, bi birin. |
| **Birîn 2** | (n.x.mê) Jûna gurzekî. :Cihek ji leşê mirovî xwîn jê bi hêt dema gurzek vê di keve. Cihê lêdanê,hingavtinê. Kul. : Birîna xencerê. |
| **Birîndar** | (hn.dar.çewa) 1. Kesê birînek liser leşê wî çêbûye. 2. Navê kurane. |
| **Birîndarbûn** | (k.jn.l.mê) Weke birînek ji egera hingavtinekê li leşê merivî bi be. :Li pevçûna di gel dujminî sê pêşmergeh birîndar bûn.(K) bn : Bûn. |
| **Birîndarkirin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov gurzekî li yekî bi de tanî xwîn ji leşê wî bê. .Dişewitandin. Çiklêdan. : Hesta xelik î birîndar di ke. (K) bn: Kirin. |
| **Birîndarkirî** | (hk.l.çewa) Tiştê hatî birîndarkirin. Tayê darê birîndar kirî ye. |
| **Birînkul** | (hn.l.çewa) Dilkul. Kovandar. Dilşewitî. |
| **Birînpêç** | (pîşn.l.dz) Kesê karê wî dermankirin û pêçana birînên birîndarane. |
| **Birînpêçan** | (k.jn.l.mê) Pêçan û girêdana birînan. (K) bn: Pêçan. |
| **Birîsî** | (birosk) (n.x.mê) Xîçek ronahî li asmanan ji egera vêketina bayê sar û gerim bargehên karebê peyda di bin û deng ronahî di hên bihîztin û dîtin. |
| **Birîsîvedan** | (k.jn.l.mê) Dema dengê birîsîyan digel ronahîyê li esmanan di hên. |
| **Birîskîn** | (k.jn.x.mê) Biriskîn. |
| **Birk** | (n.x.mê) Cihê av lê ragirtinê , çalek şêwe çaralî, lakêş yan bazinî ku avê tê dixin,. Birka avê.: Xwe havêt birkê. Ava birkê berda. Birka tijî. |
| **Birmît** | (n.x.mê) Birmût. |
| **Birmîz** | (hn.l.çewa) Mirovê gelek di mîze. Zarokê pir di mîze. Pirmîz. Yê ku bi xweve di mîze. :Zarokê birmîz. |
| **Birmût** | (n.x.mê) Arê tûtinê, pîremêr û pîrejin bi difnê hildikêşin.Birmît. |
| **Birû** | (n.x.mê) leş Mûyên bi rêz bi şêweyê kivane li hindav çavan. |
| **Birûsk** | (n.x.mê) Birîsî. |
| **Birûsklêdan** | (k.jn.l.mê) Birîsîvedan. |
| **Birxî** | (n.x.nêr) Pirtên asinên bi xirkin asin û daran pêkve peyt(tund) di kin. |
| **Birxû** | (n.x.nêr) Birxî. |
| **Biryanî** | (n.x.mê) Corekê zadîye, ji têkhelkirina birinc, goşt, pitat, biharat û htd çêdikin. |

| | |
|---|---|
| **Biryar** | (n.x.mê) Derêxistin yan derbazkirina her gotin yan kiryar bo qonaxa bicih kirinê.: Eve biryara bajêrvanîyê ye di vê em pêgirî yê pê bi keyn. |
| **Biryardan** | (k.jn.l.mê) Standina biryaran. Derbazkirina biryaran.:Biryar hat dan, ji evro û wêve cigarekêşan li rêberîyannabit. (K) bn : Dan. |
| **Biryargirtin** | (k.jn.l.mê) Biryardan.(K) bn: Birtin. |
| **Biryarname** | (n.l.mê) Nivîsara biryarê. Nameya biryarê. :Biryar daye, ko qutabî bi çin seyranê û min biryarname dîtî ye. |
| **Biryarsitandin** | (k.jn.l.mê) Biryardan. |
| **Bisemt** | (hn.dar.çewa) Bi kêrhatî. Peyt. Ji hejî. |
| **Bisk** | (n.x.mê) Du parçe ji pora serê mirovan, nemaze keçan ko di ser guhan , diber herdu rûyan da derbaz di û be di hête xwar, nexasne.:Biskên badayî, Biskên reş.Biskên dirêj. |
| **Bist** | (n.x.mê) 1.Darkek nêzî metrekê dirêj mîna şêweyê şûrîye jibo wergêrana nanê sêlê bi kar di hêt.2. Darikên zirav yan şûşikêd hesinî jibo birajtina pişkan bi kar di hêt. 3. Bihost. |
| **Bistî** | (n.x.mê) Tayên ter û nazik yên şînkatî, dava zirav ya di keve navnbra belg û çeqê daran. |
| **Bişavtin** | (k.jmê) Paqijkirina tiştê têkel di avêda wek; dan ,ax, bişavtin. Ji avê girtin.yan şûştin bi avê paşî jê gijrtin. (K) bdn :ez di bişêvin em dibişêvîn, tu di bişêvî hûn di bişêvin, ew di bişêve[..it] ewan dibişêvin. Pr: dê bi +bdn. Bdb: di bişavt, dibişavtin. Db,dûr: bişavtibû, …bûn. (F): bişêve bişêvin. |
| **Bişewat** | (hn.dar.çewa) Bi kovan. |
| **Bişewatî** | (hn.dar.çewa) Bi kovan. Kovandarî. |
| **Bişkavtin** | (k.jn.x.mê) Ji hev cihêkirin. Jêk cudakirin. |
| **Bişkivî** | (hk.x.çewa) Geş. :Gula bişkivî. Rûyê bişkivî. |
| **Bişkivîn** | (k.jn.x.mê) Geşbûn. Pişkivîn. |
| **Bişkoj** | (n.dar.mê) Gula ne gehistî, negeşbûyî. Sava. Ne vebûyî. |
| **Bişkul** | (n.x.mê)Pişkil. |
| **Bişûre** | (hn.dar.çewa) Tore. Hêris. Tengav. |
| **Bişûrebûn** | (k.jn.l.mê) Torebûn. Tengavbûn. Hêrisbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Bişûrekirin** | (k.jn.l.mê) Tengavkirin. Hêriskirin. (K) bn: Kirin. |
| **Bitim** | (n.x.mê) Corekê keskanane, ji kezwanan mezintirin. |
| **Bitir** | (hk.hevber) 1.Pitir. 2. Tore. Tirbilind. |
| **Bitirpêr** | (hk.dem.dar) Berîya sê rojan. Betirpêr. |
| **Bitirpêrar** | (hk.dem.dar) Berîya sê salan. Betirpêrar. |
| **Bive** | (hn.x.çewa) Tiştek bitirs nemaze bo zaroyan. Bela. : Agir biveye. |
| **Bivir** | (n.x.nêr) Alavek hesinî nemazeye dev tîje destikek darî pêve,bo birîna daran mifa jê tê wergirtin. … Pend : Wek bivirê melaye.ang ; kesê çi kêmasî lê nebin. Jiber ko bivirê melay yê seqakirîye û kar pê nayê kirin. |
| **Bixêrig** | (n.dar.mê) Amaneke ji cerik yan feyfûrîye di keve bin henefîya avê. Destşû. Cirne. |
| **Bixirîn** | (k.jn.x.mê) Giyandar nirenirê ji xwe di hînin dema tore di bin. Gayê mezin yê bixirî. :Kitik a di bixirit. Xinzirîn. |

| | |
|---|---|
| **Bixûr** | (n.x.mê) Madeyeke ji corên fêkî hatîye çêkirin li cejin û bîranînên pîroz di şewitînin bêhinek xweş ji dûkela wê der di keve. |
| **Bixûrdan** | (k.jn.l.mê) Dûkela bixûrê li civatê belav di kin. (K) bn: Dan. |
| **Bixûrdank** | (n.l.mê) Amaneke bixûrê tê dixin. |
| **Bixûşk** | (n.x.mê) Xîz. Berexîz. |
| **Biyanetî** | (hn.dar.çewa) Derdê biyanî û xerîbîyê. |
| **Biyanetîkirin** | (k.jn.l.mê) Hestkirin bi biyanî yê. : Ev bizine ya biyanetî yê di ke;ang: hest di ke ko ya biyanî ye û bê arame. |
| **Biyanî** | (hn.x.çewa) Kesê ne xelkê welatekî, deverekê gundekî û htd. Be. Pend :Goştê ranî, bi dî biyanî, herê pêşemanî. Brx Xuyanî. |
| **Bizanebûn** | (k.jn.l.mê) Karê mirov bi pilan û ji qesta bi ke. : Ew karê wî kirî ne ji bêdestê, lê bi zanebûn kirî ye. Brx Bêdestî. |
| **Bizankî** | (hn.l.çewa) Bizanebûn. |
| **Bizarkirin** | (k.jn.l.mê) Dema mirovek mîna yekî bi peyve. Bizarvekirin. (K) bn: Kirin. |
| **Bizarvekirin** | (k.jn.l.mê) Bizarkirin. |
| **Bizav** | (n.x.mê) Livîn. Xebat. Têkoşîn. |
| **Bizavkirin** | (k.jn.l.mê) Livîn. Xebatkirin. Pelijîn. (K) bn: Kirin. |
| **Bizavtin** | (k.jn.x.mê) Bizavkirin. |
| **Bizbizok** | (hk.dar.çewa) Livlivok. |
| **Bizdandin** | (k.jn.x.mê) 1. Piçandin. 2. Tirsandin.: Bendik bizdandin. (K) bdn: ez di bizdînim em di bizdînîn, tu di bizdînî hûn di bizdînin, ew di bizdîne[…it] ewan di bizdînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di bizdand, di bizdandin. Db,dûr : bizdandibû, …bûn. (F) : bi bizdîne, bi bizdînin. |
| **Bizdîn** | (k.jn.l.mê) Bizdandin. |
| **Bizdok** | (hn.dar.çewa) Tirsonek. Kulekfireh. |
| **Bizdonek** | (hn.dar.çewa) Bizdok. |
| **Bizêv** | (n.x.mê) Bizav. |
| **Bizin** | (n.x.mê) kewal Giyandarek şîrdere, mêye, qonaxa dawî ya tuxmîye, (kar , gîsk, tişîr, ..). |
| **Bizinakoç** | (n.l.mê) Bizin a bê qoç. Bizina bê şax. |
| **Bizinakovî** | (n.l.mê) Bizina li çol û çiyan dijît , dûr ji merivan. |
| **Bizindoş** | (karn.l.dz) Kesê şîrê bizinan di doşe. Bêrîvan. |
| **Bizink** | (n.dar.mê) 1. Darikeke dixin paşîya devê karikan û li patika wan girê di din jibo nikare guhanê maka xwe bi mêje. Devbizink. 2. Bizinna biçûk. |
| **Bizinkoç** | (n.l.mê) Bizin a bê şax. |
| **Bizinmêj** | (n.l.dz) giyandar Candareke di kevin da wesa bawer di kirin ko şîrê bizinan ji guhanan dimêje û di xwe. Bizinmişk. |
| **Bizinmişk** | (n.l.dz) giyandar Candarek xişok û kovîye. |
| **Bizir** | (hn.x.çewa) Berze. Hinda. |
| **Bizirbûn** | (k.jn.l.mê) Berzebûn. Hindabûn. (K) bn: Bûn. |
| **Bizirkirin** | (k.jn.l.mê) Berzekirin. Hindakirin. (K) bn: Kirin. |
| **Bizivandin** | (k.jn.dar.mê) Livlivandin. Livandin. |

| | |
|---|---|
| **Bizivîn** | (k.jn.x.mê) Bizavkirin.(K) bdn: ez di bizivim em di bizivîn, tu di bizivî hûn di bizivin, ew di bizive[…it] ewan di bizivin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : ez di bizivîm em di bizivîn, tu di bizivî hûn di bizivîn, ew di bizivî ewan di bizivîn. Db,dûr : ez bizivîbûm em bizivîbûyn, tu bizivîbûy, hûn bizivîbûn, ew bizivîbû ewanbizivîbûn. (F) : bi bizive, bi bizivin. |
| **Bizî** | (hn.x.çewa) Bargiranî. |
| **Bizmar** | (n.x.mê) 1. Asinek yan darek sertîje bo pêkvenûsan(girêdana) tiştan bikar tê. Mêx.2. Birîndar kirina mirovî ji alîyê derûnîve . axivtinên kirêt û nexweş. |
| **Bizmarkirin** | (k.jjn.l.mê) Bizmarlêdan. Dergeh bizmarkir. Text bizmar kir. (K) bn: Kirin. |
| **Bizmarlêdan** | (pnl.mê) 1. Bizmar kirina tiştî bo girêdanê. 2. Birîndarkirin. kirêtkirin. (K) bn : Lêdan. |
| **Bizot** | (n.x.nêr) Darê serekê wî sotî(şewitî) û geş. |
| **Bizotlêkdan** | (k.jn.l.mê) 1. Xweş, geş kirina agirî. 2. Lêk êxistina mirovan. Têkvedan. (K) bn :Lêkdan. |
| **Bizrik** | (n.x.mê) Pirsik. Kulik. |
| **Bî** | (n.x.mê) fêqî Bih.Bîh. |
| **Bîber** | (n.x.mê) giya Filfil. :Bîbera sor. Bîbera kesk. Bîbera tîj. |
| **Bîbîk** | (n.x.mê) 1.Reşika çavî. Nîva çavî.Zarokê zava. Pizok. |
| **Bîbok** | (n.x.mê) Bîbîk. |
| **Bîh** | (bih) (n.x.mê) fêqî 1. Darek fêqîye. 2. Fêqîyeke tam û bêhin xweşe. Pend :Ker tama bîhê nizanit. Ang; kesê bihayê tiştî nizane. |
| **Bîhn** | (n.x.mê) Bêhin. |
| **Bîhndar** | (hn.dar.çewa) Tiştê bêhin jê dihêt. Bi bêhin. Bêhindar. |
| **Bîhnfireh** | (hn.l.çewa) Bêhinfireh. |
| **Bîhngirtin** | (k.jn.l.mê) Bêhinvedan. Bêhin înan, birin. |
| **Bîhnkirin** | (k.jn.l.mê) Bêhinkirin. |
| **Bîhnok** | (n.dar.mê) Bêhnok. (,). |
| **Bîhok** | (n.x.mê) Darek bê bere, avîye, ciwan û xemildare, sîbera wê dil vekere. |
| **Bîjin** | (n.l.mê) Jina mêrmirî. Jina berdayî. Jina bê mêr. |
| **Bîjî** | (hk.x.çewa) 1. Nivş yan tuxmê ne bi rêyên rewa peyda di bit.2. Kesê lêbûk û bingelte. |
| **Bîjok** | (hk.dar.çewa) Dirinde. Hov. |
| **Bîkar** | (n.dar.nêr) Renok. |
| **Bîk** | {bûk} (n.x.mê) 1.Keç , jin li dema şahîya şwî(mêr) kirina wê. 2. Kabanîya kurê mirovî. |
| **Bîkmar** | (n.l.nêr) Giyandarek xişûk û biçûke bi dest û pê ye. |
| **Bîme** | (n.x.mê) Giroveya bîmekirinê. |
| **Bîmexane** | (n.dar.mê) Cihê, avahîyê,berpisyar jibo bîmekirinê. |
| **Bimekirin** | (k.jn.l.mê) Heger mirov, xwe û navmalîyê, bîme bike, herdema mirov rastî çamek yan nexweşîkê hat, yan tiştê mirovî hat dizîn, şewitîn jinavçûn û htd, mirov di kare pere li cihê ziyana xwe werbigire. (K) bn: Kirin. |
| **Bînahî** | (n.dar.mê) Bînayî. |
| **Bînayî** | (n.x.mê) 1.Dîtin sînayî.2. Xweşdivî, bînayîya çavan. |

| | |
|---|---|
| **Bîner** | (n.dar.dz) Temaşevan. Yê di bîne. :Bînerên telefizyonê. |
| **Bînîn** | (k.jn.x.mê) Dîtin. (K) : Bdn:ez di bînim em di bînîn tu di bînî hûn di bînin, ew di bîne[…it] ewan di bînin. Pr: dê[bi]+ bdn. Bdb : di dît, di dîtin. Db,dûr: Dîtibû, … bûn. (F) : bi bîne, bibînin. |
| **Bîr 1** | (n.x.mê) Hizir. Boçûn. |
| **Bîr 2** | (n.x.mê) Cihê av lê kom di be. Çala avê.:Av ji bîrê hilkêşa. |
| **Bîra** | (n.x.nêr) Birayê jina mirovî. Xizim. |
| **Bîranîn** | (k.jn.l.mê) Saxkirina cejin û bûyerên neteweyî,dînî, şehîdan (nemiran) .Bîrewerî. Yadkirin. (K) bn:Anîn. |
| **Bîrbir** | (hn.dar.çewa) Qonaxa jiyê mirovî piştî sinêleyîyê.Merivêgehiştî. |
| **Bîrbirin** | (k.jn.l.mê) Li bîra xwe anîn. |
| **Bîrborî** | (hn.dar.çewa) Mirovê bêhoş. |
| **Bîrborîn** | (k.jn.l.mê) Dilgirtin. Bêhoşbûn. |
| **Bîrdar** | (hn.dar.çewa) Hoşmend. Xwedî bîr. Xwedî hizir. |
| **Bîrdarî** | (n.dar.mê) Zîrekî. Bîrtîjî. |
| **Bîrdoz** | (n.l.mê) Dîtina bîr, hizran. Tîyûrî. |
| **Bîre** | (n.x.mê) Vexwarineka kiholî ye. |
| **Bîrhatin** | (k.jn.l.mê) Bîranîn. : Bîra min di hêt wekî ezê biçûk me li vêrê yarî di kirin. |
| **Bîrhatî** | (n.l.mê) Zindîkirina tiştê li bîra meriv mayî. Bîrhatin. |
| **Bîrname** | (n.l.mê) Nameya bîranînan. |
| **Bîrov** | (n.x.mê) Nexweşîyeke ji egerê tewil , yan pinîyên dewkî, gewir yan sipî liser leşî, (rû, dest) çêdibin. |
| **Bîrovî** | (hn.dar.çewa) 1.Kesê bîrov li leşî hebin. 2. Pinîya mîna bîrovê. |
| **Bîrtîj** | (pn.l.çewa) Kesê tişta jibîr neket , her li bîrê bin. Hizirtîj. |
| **Bîrûbawer** | (n.l.mê) Xebat û doza mirovî bawerî pê heye û qurbanîyê jêra di de. |
| **Bîrveçûn** | (k.jn.l.mê) Ji egera pêkevtina gurzekî yan mizgînek dilşewat bêhina mirovî çik di be, hind caran bêhoş di be. (K) bn: Çûn. |
| **Bîrweranî** | (n.dar.mê) Binav salveçûn. Gehiştin. |
| **Bîrxistin** | (k.jn.l.mê) Li bîra xwe anîn. Zindîkirin. Saxkirin. Hizir. (K) bn: Xistin. |
| **Bîrxistok** | (n.l,dar.mê) Nameyeke jibo cihek yan alîyek pêdvî dinêrin, yan ra digehînin ji pêxemet xuyakirina helwîstekê hemberbûyerekê. |
| **Bîsk** | (hk.dem.mê) Demek kurt. Gavek. Bîstek. : Ezê bîskê herim mala cîranê xwe, kanê çi di ke. |
| **Bîst** | (hij.n.) Hijmara 20. 10+10= 20. |
| **Bîstan** | (n.x.nêr) Erdê tere [aro, bacan, bacanreş, bamî, û htd] lê dihêt çandin û çinîn. Bax. Cinîk. |
| **Bîstek** | (hk.dem) Demek kurt. Gavek. Bêhnek. Bîsk. |
| **Bîstemîn** | (hijn,rêzkirin) Ya/yê/yên bîstê. |
| **Bîşeng** | (n.l.mê) Corekê bîhokane xemildar û ciwane, ta û belgên wê mîna porê di hêt xwar. |
| **Bîşî** | (n.x.mê) Rîşîk. |
| **Bîtik** | (n.x.mê) Corekê pirsikane nemaze li zîhên cavan di hên. Bûkik. |
| **Bîv** | (n.x.mê) Delîve. Derfet. Dem. |

| | |
|---|---|
| **Bîz** | (n.x.pirîn) Qîşikên ristina goran. |
| **Blêç** | (n.x.mê) Birûsk. Birîsî. |
| **Blûr** | (n.x.mê) Bilîl. |
| **Blûrvan** | (n.dar.dz) Bilîlvan. |
| **Bo** | (pêrb. alv.pêvgir) rêzman 1. Alaveke jibo pirsînê bikar di hêt. Boçî. Çima. Te bo we kir. 2. alavê hebûnê Ji. Bo kê? Bo min . Bo te. Ang; ji kêra. 3.Alavê sent kirinê. Ber bi çi sentê ve. Bo kîrê, bo kûve?. |
| **Boçî** | (pêrb alv.pis) rêzman Alavê pirsînê Bo. Çima.: Boçî duh tu nehatî civînê ?. |
| **Bombe** | (n.x.biyan.mê) Top. |
| **Bombebaran** | (n.l.mê) Barîna gule û bomban mîna baranê. Topbaran. |
| **Bombebarankirin** | (k.jn.gl.mê) Top havêtin ser cihekî. Topbarankirin. (K) bn: Kirin. |
| **Bona** | (pêrb.alv.merc) rêzman Alaveke mîna merc û sedem bi kar dihêt. Ji bona jiber. : Ji bona te ez hatim vir. |
| **Bor** | (pn.x.çewa) 1.Tiştek bi tov. Pir . tijî, genim, ceh birinc û htd, bor. Brx Qelal. 2. Rengek gewirê tarî ye. 3. Deravê çem(rîbarî) cihê tenk bo derbazbûnê. Pend : Da borî. ang:dema mirovgotineka ne di cih û demê xwe da bêje.4. Bekere (bûrê dezî =bekerê dezî).5. kevin Hesp(dastana borê reş, hespê reş ya folkilorî). |
| **Borandin** | (k.jn.x.mê) Derbazkirin. Dem borandin. : Ewî yê ji babe xwe borandî bi gotina stiranan. (K) bdn: ez di borînim em diborînîn, tu di borînî hûn di borînin, ew di borîne[…it] ewan diborînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di borand, di borandin. Db,dûr : borandibû, …bûn. (F) : bi borîne, bi borînin. |
| **Borangeh** | (n.dar.mê) Hêlîn yan lîsê kotiran. |
| **Bore** | (n.x.mê) Dengê çêl û kewalan. Marîn. Barîn. |
| **Borebor** | (n.dar.mê) Bore. |
| **Borêreş** | (n.l.nêr) Hespê reş di dastana sîsebanê da. |
| **Borî** | (n.x.mê, k,derbaz) 1. Lûlekên dirêj û nîva wan vala jibo veguhaztina avê û şileyên din.2. Çû. Derbazbû. |
| **Borîn** | (k.jn.x.mê) Derbazbûn. Biserdaçûn. Biserveçûn. (K) bdn: ez di borim em di borîn, tu di borî hûn di borin, ew di bore[…it] ewan di borin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di borîm , di borî, diborîn. Db,dûr : borîbûm, bû,..bûyn…bûn. (F) : bi bore. Bi borin. |
| **Borîzan** | (karn.dar.dz) Kesê şareza di warê jenîna amêrên mûzîkê yên pifkirinê da. |
| **Borse** | (n.biyan.x.mê) Cihê gihorîn (kirîn û firotin)a diravî. |
| **Bosî** | (hk.x.çewa) Xwarina sotî. Tam û bêhina zadê şewitî. |
| **Bosîbûn** | (k.jn.l.mê) Zêde kelîna zadî ta bosî bi be.Sotina xwarinê di amanan da. |
| **Bosîkirin** | (k.jn.l.mê) Sotina zadî dema zêde di kelit.(K) bn :Kirin. |
| **Bost** | (n.x.mê) Bihost. |
| **Boş** | (pn.x.çewa) 1. Ava boş Pir. Tijî. Mişt. 2. Xilole. Vala. |
| **Boşahî** | (n.dar.mê) 1. Valayî. 2. Pirînî. Gelek. Dengûdor. |
| **Boşatî** | (n.dar.mê) Male, cihek pir ji mirovan. |

| | |
|---|---|
| **Boşbûn** | (k.jn.l.mê) Pirbûn . Zêdebûn. : Li biharê avên co û robaran boş di bin.(K) bn : Bûn. |
| **Boşkirin** | (k.jn.l.mê) Zêdekirin. Pirkirin. : Heger ava coyê boş nekî, nikarî avdanê liber bikî. (K) : Kirin. |
| **Bot** | (n.x.mê) 1. Kun. 2. Pêlav. Pot. |
| **Botan** | (cugraf,n.hkdev) Devereke. Hozeke li Kurdistana bakûr, devera Cizîrê. Mîrnişîna bi navê xwe navdare.warê Mem û Zînê. |
| **Botik** | (n.x.mê) Cihê av jê di havêt . yan tête xwarê, nexasme diborîkan da. Borî. Qirik. |
| **Boz** | (pn.x.çewa) Dewkî. Poş. |
| **Buha** | (n.x.nêr) Biha. |
| **Buhar** | (hk.dem.mê) Bihar. |
| **Buhartin** | (k.jn.x.mê) Borandin. |
| **Buhêrk** | (n.dar.mê) rêzman; Dema derbaz. Dema borî. |
| **Buhtan** | (n.dar.mê) Bêbextî. Direw. Xapandin. |
| **Buhuşt** | (n.x.mê) Beheşt. |
| **Buhtankirin** | (k.jn.l.mê) Direw, bêbextî kirin. Xapandin. |
| **Bujîn** | (k.jn.x.mê) Weke meriv pir ji tiştekî hez bi ke. Dilê mirov tiştekî bi xwaze. Di bujim , bi buje. |
| **Bulbul** | (n.x.nêr) Bilbil. |
| **Bulgarî** | (nejn.n.dar.dz) 1. Xelkê Bulgarya. 2. Kelûpelên ji Bulgarya. |
| **Bulgarya** | (hk.cih. cugrn) Welatê Bulgaran. |
| **Bulgaristan** | (cugrn. Hk.cih) Bulgarya. |
| **Bulq** | (n.x.mê) Bilq. |
| **Bulqhavêtin** | (k.jn.l.mê) Bilqhavêtin. |
| **Burno** | (n.x.mê) Tivengek dirêje , peyvek bîyanîye , lê bûye çembera berxwedana gelê kurd, nîşana pêşmergatîyê ye, nemaze pêşmergeyên eylolê. |
| **Burxî** | (n.x.nêr) Birxî. Birxû. |
| **Buxçik** | (n.x.mê) Parçe perokek lakêşe yan çargoşeye, bo nixavtin û parazatina çilik, nan, xwarin û htd. Mêdek. Serhevîrk. |
| **Bûjen** | (n.x.nêr) Madde. |
| **Bûk** | (n.x.mê) Bîk. Pend :Bûkê di gel te me, xesoyê guh bidê!.Pend:Bûk bi dilê zavaye.ang ; heger karek bi dilê êkî be, guh nade tu kesan. Pend : Bûkek hîna bi lez û bez,me lêdan rez û pez, sivik a malê bûme ez. Pend :Bûka salê berde nav malê. |
| **Bûkabaranê** | (n.l.mê) Helameteke li gund û kolanan di gerînin xelik avê pêda di kin dako baran bi bare. &emo. |
| **Bûkemar** | (n.l.nêr) Bîkmar. |
| **Bûkînan** | (n.dar.mê) &eva êkê ko bûk bi zava reye. |
| **Bûm** | (n.x.mê) balinde Kund. |
| **Bûn** | (k.jn.x.mê) Kirin . Rûdan. :Biraye te dê bit çi? Dê bite endazyar. (K) bdn: ez di bim em di bîn, tu di bî hûn di bin, ew dibe[..it] ewan di bin. Pr dê[bi] + bdn. Bdb ; bi bû, bi bûn. (F) : bibe, bi bin. |

| | |
|---|---|
| **Bûnebûn** | (n.l.mê) Bûyer. |
| **Bûş** | (hn.x.çewa) Rêl. Pir. |
| **Bûşelan** | (n.dar.mê) Ava bo4. Çem yan cokên avê dema bo4 di bin. Darûbarên pir. Rêl. |
| **Bûtik** | (n.x.mê) Kepir. |
| **Bûyer** | (n.dar.mê) Rûdan. Qewmîn. Evsane. Çîvanok. |
| **Bûyîn** | (k.jn.x.mê) Ji daykbûn. Peydabûn. Zayîn. |

# C

| | |
|---|---|
| **C** | pîta sîye ji abeya kurdî. |
| **Ca** 1 | (n.x.nêr) 1. Cih. |
| **Ca** 2 | (pêrb.av girêdan) Vêca . Evca. |
| **Cacik** | (n.x.nêr) Xwarineka rêçalîye , xiyar û swîr an di kin nav mastî. |
| **Cade** | (n.x.mê) Rêya tirombêl û makînan . şarê.rêyek pan , mezin. |
| **Cadibaz** | (karn.dar.dz) Cadûger. |
| **Cadibazî** | (n.dar.mê) Cadûgerî. |
| **Cadir** | (n.x.nê) 1.***giya*** Catir. Catirk. 2. Kevne navek mêran(peyayan ) zelamane. |
| **Cadû** | (n.x.mê) Niviştî.yên ko mela, şêx û xêvzank, bi nexweşên giyanî yan derûnî ve di kin jibo nojdarî û paristin ji ecine,pîrhevî û giyanên xirab. |
| **Cadûger** | (karndar.dz) Mirovê cadû, niviştîyan çê dike. Niviştvan. |
| **Cadûgerî** | (kar.n.dar.dn) Karê cadû, niviştî kirinê. |
| **Caf** | (malbn) Navê tîrek (hozek)a kurdane li başûrê Kurdistsn. |
| **Cahşik** | (n.dar.nêr) Cehşik. |
| **Calcaloke** | (n.dar.mê) Tevinpîrk. Dapîroşk. |
| **Cam** | (n.x.mê) 1. şûşeya penceran. şûşeya di xin ser keval û wêneyan. 2. Tirarê avê. |
| **Cambaz** | (n.l.dz) Kesê leşsivik û pehlewan.şareza di hunerê livînêda. |
| **Cambazî** | (karn.dar.mê) Karê canbazan. Lîztina canbazan. |
| **Cambazîkirin** | (k.jn.l.mê) Bi karê canbazîyê ra di bin. (K) bn : Kirin. |
| **Cambazxane** | (n.l.mê) Cihê fêrbûna canbazî û yarîyên cambazîyê. |
| **Camêr** | (hn.x.çewa) Pesindana mirovê baş, qenc, hêja, çavvekirî. : Te banê min digel yê xwe gêra, supasîya te dikim, tu camêrî.:Dê bi hêle bi bi peyvit camêr!. |
| **Camêrî** | (n.dar.mê) Mirovê kiryara wî baş. Merdînî. Serferazî. |
| **Camker** | (pîşn.dar.dz) Yê karê wî camkirina pencer, derî û htd. |
| **Camkirin** | (k.jn.l.mê) Cam xistine pencer û degehan. (K) bn: Kirin. |
| **Camxane** | (n.l.mê) 1. Dikana firotina caman. 2. Xanî, avayîyê ji caman diristkirî. |
| **Can** 1 | (n.x.nêr) Giyan. Têhna saxîya leşî. : Keç û xort canê xwe dikin qurbanî doza gelê xwe. |
| **Can** 2 | (pn.x.çewa) Xweşik. Xuşkok. şirîn. Ciwan. : Cilikêd te pir di canin. |
| **Canan** | (n.dar.mê) Xeş divî. |
| **Canavêtin** | (k.jn.l.mê) Bi dil û can xwe avêtin karekî, ti4tekî. Pir hezkirin. |
| **Canbaz** | (n.dar.dz) Cambaz. |
| **Canberî** | (n.x.mê) Candarekê deryayîye, hûrike mîna kirim a ne, mirov jibo xwarinê nêçîr di kin. |
| **Canbêzar** | (hn.l.çewa) Pir westiyan. Gelek mandîbûn. Kesîrebûn. |
| **Candan** | (k.jn.l.mê) Canê xwe kirin qurban jibo dozeka hejî. : Jibo azadîya welat em amadene canê xwe bi din. (K) bn: Dan. |
| **Candar** | (n.dar.nêr) Giyandar. Canewer. Mirov, hesp, pez, kotir û htd candarin. |
| **Canega** | (n.l.nê) Gayê can. Xurt.ne pîr. Golikê xurt ê nêr. |

| | |
|---|---|
| **Canemerg** | (hk.l.çewa) Mirina zû. Kesê hêj genc,xurt di mirit. |
| **Canewer** | (n.dar.dz) Giyandar.Giyanewer. Ginawir. |
| **Canê** | (n.dar.hd.mê)1. Navê jinane. Ji canîyê hatîye.2. Gazîkirin û naznavê keçka can. |
| **Canêş** | (hn.l.çewa) Hest û deronê birîndar. Bêzar. Kovandar. |
| **Canfeda** | (hn.l.çewa) Kesê canê xwe gorî dozekê bike . qehreman. Qurban. |
| **Canfedakirin** | (k.jn.gl.mê) Canê xwe kirin feda. (K) bn: Kirin. |
| **Canfedayî** | (n.l.mê) Xwe gorîkirin. Qurbanî. |
| **Cang** | (n.x.mê) Core peroyekê sipîye wek cilkên xewê yan binda di ken ber xwe, yan jibo kifinê mirîyan bi kar di hînin. ***Pend*** :Cangê wî bû rîs.ang; şermizar bûn. |
| **Canga** | (n.l.nêr) Canega. |
| **Cangiran** | (hn.l.çewa) Mirovê hertim mandî û leşêş. Zemro. Gemjo. |
| **Cangorî** | (hk.l.çewa) Kesê canê xwe jibo rêyeka pîroz dike gorî. Canfeda. |
| **Cangorîkirin** | (k.jn.gl.mê) Canê xwe di ke qurban.: şehîdan cane xwe kirin gorî welatî, jibona gel azad bi be. (K) bn: Kirin. |
| **Canik** | (n.dar.mê) Jin . Keç. Xatûn. Brx Camêr. |
| **Canî** | (n.dar.mê) 1.Cehşê hesp, hêstir, yê can. |
| **Cankuj** | (hn.l.çewa) Kujek. |
| **Canpola** | (n.l.dz) Merivê canê wî mîna polayî qayîm. Mêrxas. Xweragir. |
| **Cantik** | (n.dar.nêr) Cihoreke ji bendikên hirî yan qayîşê hatîye diristkirin, jibo têkirina kelûpelan mifa jê di hêt wergirtin. |
| **Cewtik** | .:Cantikê xwarina xwe bi milê xwe ve kir û çû ser karî. |
| **Canxweş** | (hn.l.çewa) Merivê leşsax û peyt. Saxlem. Gişt. |
| **Canxweşbûn** | (k.jn.gl.mê) Peytbûn. Saxbûn. : Canê te xweş be ko te ji mere lawik gotin. (K) bn : Bûn. |
| **Canxweşî** | (n.l.mê) Leşsaxî. Nojdarî. Peytî. |
| **Canzer** | (hn.l.çewa) Ji egera nexweşî, tirs yan lewazîyê, canê merivî zer xuya di ke. Pêt. |
| **Canzerbûn** | (k.jn.gl.mê) Canê mirovî jiber tirs, nexweşî yan lewazî, zer di be. (K) bn : Bûn. |
| **Car** | (n.x.mê) Ger. Hel. :Cara yekê min tu li mala Azadî dîtî. ***Pend***:Car pîroz di bin car qiloz di bin(di kevin). ***Pend*** :Car bo di mirin, car pê di mirin. |
| **Caran** | (hk.dem) 1.Hin caran. Di demekîda. 2. Ji mêje. Berê. |
| **Carcar** | (hk,dem.rêzkirin.l) Demek nediyar, ne rêk. Hindek caran. Heyam heyam. Ne herdem. |
| **Carcaranjî** | (alv pêvegir) Hinde caran jî. |
| **Carcûr** | (n.x.nêr) Sacûrê tivengan yê ko guleyan di xin nav. |
| **Cardin** | (hn.dem.jêgirtin) Careka dî. Carek din. Paş. Delîvek din. |
| **Carek** | (hijn.l.mê) Demek vebrî.. Ek car. ***Pend*** :Carekê di bêjin befra sare. |
| **Carekê** | (hk.dem) Demekê. Serdemekê. Rojekê. Carekê ji caran. |
| **Carina** | (hk.dem) Caran. |
| **Caş** | (hn.x.çewa) Ji navê kerî hatî wergirtin . ang ; Kesê çekê dujminî hildigirit dijî gelê xwe. Xwefiroş. Çete.Rêgir.Ker. |

| | |
|---|---|
| **Caşatî** | (karn.dar.mê) Yê di be caş, caşatîyê di ke. : Kesê caşatîyêdijî gelê xwe bike, liber çavên xelkî hertim rûreşe. |
| **Caşik** | (n.dar.nêr) Cehşik. Kerê biçûk. |
| **Catir** | (n.x.mê) *giya* Giyayek tiraşoke belgên wî di hûrik û boz ve ne,bo nav xwarinan bi kar di hînin, tam tîje. :Catirk kir nav zadî. :Îpraxêd bi catirk. |
| **Caw** | (n.x.mê) Perokên ji hirî, pembû û avirmîş. |
| **Cawbir** | (n.l.mê) Amêreke jibo birîna hirî û mûyên kewalan û pora mirovan bi kar di hêt. Cew. :Pora xwe bi cawbirê kur kir. |
| **Cawbirkirin** | (k.jn.gl.mê) Kurkirin û birîna pora seran yan hirî û mûyên kewan bi cawê. |
| **Cawîn** | (n.dar.mê) Caw. |
| **Caz** | (n.x.mê) ***mûzîk*** Awazek , selîqek mûzîkê taybete. ji alîyê reşên bakûrê Emrîka ve hatîye pêşxistin û mûzîka afrîkî û rojavayî kartê kirina lêkirî. |
| **Ce** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo xweşkirin û bihêzkirina axivtinê tê(dihêt) bikar anîn. Ce bixudê. Ce bira. |
| **Cebar** | (pîşn.x.dz) Kese dest û pêyên şikestî yên mirov û giyandaran ve di girit. |
| **Cebilxane** | (n.dar.mê) Cihê danana çekan. |
| **Cebirandin** | (k.jmê) Cebirîn. |
| **Cebirîn** | (k.jmê) 1.Dest, pê, (cihê), piştî şikestinê xwe lêkdayî. 2. Bergirtina fêqî. :Bahîvî kulîlkêd xwe hemî cebirandin. |
| **Cedew** | (n.dar.mê) Nexweşîyeke, kewalan di girit, ko dev û lêvên wan kul di bin. |
| **Cedewgirtin** | (k.jn.l.mê) Candar rastî cedewê di bin. Girtina nexweşîya cedewê. (K) bn: Girtin. |
| **Cefa** | (n.x.mê) Derd. Westan. Zehmetî. Renc. |
| **Cefakar** | (hn.dar.çewa) Kesê pir zehmetê di bîne. Yan zehmet dîtî. |
| **Cefakêş** | (hn.dar.çewa) Yê gelek derd û nexweşî kişandine. |
| **Cefakêşan** | (k.jn.gl.mê) Dema mirov pir derd û zehmetan di bîne. Cefakişandin. (K) bn: Kêşan. |
| **Ceg** | (n.x.nêr) Amêreke bo bilindkirina makînan ji alîyê fîteran ve kar pê tê kirin, bo çêkirina tiromêbêlan, terekiran htd. |
| **Ceger** | (n.x.mê) 1.***candarî*** Mêlak. Kezeb. Cerg.2. Nivş. : Kurê/ keça wî/wê; cegera wî /wê ye. |
| **Cegerhez** | (hn.l.çewa) Dayk yan bavê pir ji zaroyên xwe hez di ke. |
| **Cegersotî** | (hn.l.çewa) Mirovê xweşdivîyekê wî wexera dawîyê kirîye. Dilsotî. Kovandar. Tanotî. |
| **Ceh** | (n.x.mê) ***giya*** (*dan)* Mitayek çandinîye. Daneke jibo xwarinê nemaze, alîka giyandaran , gelek corên xoşav û xwarinan jê çêdikin. |
| **Cehcîr** | (n.l.nêr) Cercîr. Xîzê gir yê ber avan di ken nav çîmentoyê bo karê avayîyan. |
| **Cehd** | (n.x.mê) Cade. şarê. |
| **Cehik** | (n.x.nêr) Aro. Xiyar. |
| **Cehiş** | (n.x.dz) 1. Têjikê keran. Ker. 2. Kesê xwe firotî û çekê dujmin dijî gel hidigirt. Caş. Cahiş. |
| **Cehzeran** | (hk.dem.l.mê) 1.Meha despêka havînê. Meha şeşê. Xizîran.2. burc; Cêmik. |

| | |
|---|---|
| **Cejn** | (n.x.mê) Bîranînên dînî neteweyî :Cejna Newerozê, qurbanê,Remezanê, cemayê. |
| **Cejnane** | (n.dar.mê) Diyarî û xelatên bi helkevtina cejnan. |
| **Cejnname** | (n.l.mê) Kartên bi reng û nivîs xemlandî, li cejnan dikin diyarî bo kes û nasan. |
| **Cejnpîrozî** | (n.l.mê) Silaveka taybete pê cejna hevdu pîroz di kin. |
| **Cejnpîrozkirin** | (k.jn.gl.mê) Cejna hevdu pîrozkirin. : Em jibo cejnpîrozkirinê çûn mala hevlê xwe. (K) bn: Kirin. |
| **Celadet** | (hn.x.çewa) Mêxasî. Mêranî. |
| **Celal** | (n.x.nêr) Çok. Rîbar. Çem. |
| **Celalî** | (malb,n) Hozeka kurdane li Kurdistanê. |
| **Celeb** | (n.x.nêr) 1. Birek, kerek pezî. Komek kewalan.2. Hevsarê dewaran.3. Cor. Rêbaz. |
| **Celebnav** | (n.l.nêr) ***rêzman*** Navê lêkdayî; wek keyfxweş. Dilveker. Sersipî. |
| **Cem** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo cihê nêz bi kar di hêt. Li cem . Li nik. Li def . al. :Ew li cem te ye? : Were cem min rûne. |
| **Cema** | (n.x.mê) Cejneka dînî ya êziyîyane. |
| **Cembelî** | (n.x.nê) 1. Mîrê hekarî di gelek serhatîyan da base navdengê wî hatîye kirin.2. Navê peyayan(zelam)e. |
| **Cembaz** | (karn.l.dz) Canbaz. |
| **Cemciqandin** | (k.jn.dar.mê) Pirtikanin. Hincinandin. |
| **Cemedanî** | (n.x.mê) Dersok. Kivink. şaşik. : Bapîrî cemedanî li serê xwe kir û çû nêçîrê.Cemedanî gelek liser şelûşepikan di hêt.:Cemadanîya sor. Cemedanîya reş. Cemedanî girêda. |
| **Cemik** | (n.dar.mê) Milhêb. Duguh. Çarguh. :Bi cemikê danebayê diken. |
| **Cemser** | (n.l.nêr) Gopika serî. Kulovank. Pol. :Cemserê bakûr û başûr ê goka erdî. |
| **Cenabet** | (n.x.mê) bi cenabet;Mirovê karê guhnelî kirî hêşta cane xwe jarav nekirîye. |
| **Cenabetkevtin** | (k.jn.l.mê) Mirovê cenabet liser. (K) bn: Kevtin. |
| **Cencer** | (n.x.mê) Amêrekê mezine li şêweyê tirobêlê, bi dwîv dewaran ve di kin bi zivrîna balteyên ji devên bivrên tîj pêkhatî qeselê hûr di ke û di ke ka, dako dan û kayê ji hev cuda bi kin. |
| **Cencerkirin** | (k.jn.l.mê) Qutan û hûrkirina qesela genim,ceh, nîsk û htd bi amêrê cencerê. : Cuxîn hêjta ji cencerkirinê bi dawî ne hatîye. (K) bn :Kirin. |
| **Cenculok** | (n.dar.mê) Candareke(jiyê wî ji du sal û pêhel) rengê xwe mîna cihê lê, di guhêre. |
| **Cendek** | (n.dar.nêr) Canê candarên mirî. Terim. Kelex. Keleş. : Nêçîvanî gurg kire cendek. |
| **Cendirme** | (n.biyan.dz) Polîsê leşkerî. |
| **Ceng** | (n.x.mê) Pevçûn . şer. şoreş. : Cenga cîhanî a yek û duwem. |
| **Cengawer** | (karn.dar.dz) şervan . şoreşvan. Yê pişkdar di cengê da. |
| **Cengbaz** | (karn.dar.dz) Cengawer. |
| **Cengîn** | (k.jn.x.mê) Pevçûn. Pevdaçûn. Cengkirin. (K) bdn :Ez di cengim em di cengîn, tu di cengî hûn di cengin, ew di cenge[...it] ewan di cengin. Pr dê bi + bdn. |

| | |
|---|---|
| | bdb : ez di cengîm em di cengîn, tu di cengî hûn di cengîn, ew di cengî ewan di cengîn. Db,dûr : ez cengîbûm, em cengîbûyn(bûn), tu cengîbûy, hûn cengîbûn, ew cengîbû, ewan cengûbûn. (F) : bi cenge, bicengin, bi cenge. |
| **Cengkirin** | (k.jn.l.mê) Pevçûn. şerkirin.: Emê dijî dagîkeran cengê bi kin. (K) bn : Kirin. |
| **Cengname** | (n.l.mê) Name yan giroveyên kirin û dawî anîna cengê. Giroveyên liberyî cengan. Çîrokên liser cengê. |
| **Cer** | (n.x.nêr) Amaneke ji axek nemaze çê di ken bo av têda bêt higirtin û tezî bi be. Kedîn. :Xatûnê cerê avê danî ser milê xwe. ***Pend*** :Cer bi rêya avê ve di şikêt. ang ; mirov çi û li kîrê kar dike,dê mîna wê û li wêrê rastî bûyeran bi bit. |
| **Cerbader** | (n.l.nêr) Amêreke serê wî tîj û pane yan xaçî ye, jibo peytkirin û vekirina birxûyan bi kar di hêt. Dernefîs. |
| **cercer** | (n.dar.mê) Corekê ristikane, ji zêr yan zîvîye. |
| **Cercîr** | (n.x.mê) Cehcîr. |
| **Cerde** | (n.x.nêr) Birek mirovane rê li xelkî digirin di şelînin. Çete. |
| **Cerdel** | (n.dar.mê) Setila şîrî, avê. Setil. |
| **Cerdevan** | (n.dar.dz) Mirovên diz û rêgir. Çete. Qaçaxçî. :Cerdevanan bi ser gundî da girtin û terş kewalên wantalankirin. |
| **Cerg** | (n.x.nêr) Mêlaka giyandaran. Ciger. 2. Nîşana kesên xweştivî. :Daykê gazî kurê xwe kir û gotê cergê min ka tu ?. |
| **Cergdar** | (hn.dar.çewa) Çavnetirs. Mêrçak. Bi cerg. :Pêşmergeyên cergdar.ang ;pêşmergeyên qehreman. |
| **Cest** | (hn.x.çewa) Mirovê peyt. Mirovê zîx. Çixt. Çîst. |
| **Cext** | (n.x.nêr) Misoger kirina tiştî. Destnîşankirina tiştî. |
| **Cew** | (n.x.mê) Amêreke jibo tiraşîna[birîna] mûyên kewalan yan pora serê mirovan bi kar di hêt. Cawbir. Hevring. |
| **Cewdik** | (n.x.mê) Amanekê av tê kirinêye, ji peroyek qayîm hatîye çêkirin, bo vexwarina avê li kar û aqaran. |
| **Cewî** | (n.x.mê) Madeyeke nîseke ji qurm û tayên daran derdikeve. Strk. |
| **Cewkirin** | (k.jn.l.mê) Tiraşîn.(K) bn : Kirin. |
| **Cewr** | (hn.x.çewa) Bikar anînîna hêzê. Xurtî. Kotekî. Zorî. |
| **Cewrik** | (n.dar.pir) Têjik, kûçikên segan. Seyê biçûk. |
| **Cewtik** | (n.dar.nêr) Cantik. |
| **Cezme** | (n.x.mê) Pêlava basik dirêj.bo parastina pêyan ji serma, teqin ,stirî.û htd. |
| **Cezû** | (n.x.nêr) Cezwe. |
| **Cezwe** | (n.x.nêr). Amanek taybete yê têda kelandin û daxkirina qehwê. Qehwedan. |
| **Cê** | (n.x.mê) Cih . Şûn . War . |
| **Cêbûn** | (k.jn.l.mê) Cihêbûn. Cudabûn. Ji hev dakevtin. Jêkvebûn. (K) bn: Bûn. |
| **Cêga** | = Cê. Cih. |
| **Cêkerî** | (n.dar.mê) Navçegerî. Derverperistin. |
| **Cêkirin** | (k.jn.l.mê) Cudakirin. Cihêkirin. Ji hev qutkirin. Jêkcudakirin. (K) bn: Kirin. |
| **Cêmik** | (n.x.mê) Du zaro kar ,berx yan pitir. htd bi hevre.li dema zanê. |
| **Cênig** | (n.x.mê) Cênîk. |

| | |
|---|---|
| **Cênîk** | (n.x.mê) Rêze mûyên pirça serî û rîh(rihdîn) êd mirovî, liser herdu sîretan di gehînit hev. |
| **Cifre** | ( n.cîha.mê) Nivîs, axivtin yên nexasime di hên bi kar anîn dako alîyên dij nepenîyên wan tê negehin. |
| **Cifte** | (n.x.mê) Core tivengeke bo nêçîra giyandar û tewalan bi kar di hînin.Qurpe. Cifteya xwe bi milê xwe ve kir. Cifteya du lûlî. |
| **Cigare** | (n.x.mê) Tûtin di nav kaxezeka pêçayî bi forma(şêwe) lûleyî, agirî di berdinê dûkêla wê di kêşin. |
| **Cigarekêş** | (pn.l.çewa) Kesê cigaran di kişîne. Kesê cigareyan ve di xwe. :Mirovê cigarekêş yê kêmxwereye. |
| **Cigarekêşan** | (k.jn.l.mê) Weke mirov cigareyan bi kêşit. :Ez cigaran nakêşim. Cigarekêşan qedexeye. (K) bn : Kêşan, |
| **Ciger** | (n.x.mê) Cerg. Mêlak. |
| **Cih** | (n.x.nê) 1ûn. War. ***Pend*** :Ber li cihê xwe bi qedre.***Pend*** :Neçe cihê tu kesê te lê nebe.: Kurdistan cihê jiyana meye. : Here ser cihê xwe bi nive. :Cihê wî li def me nemaye. |
| **Cihal** | (n.x.nêr) Tûrkek(twîrik) ji bendikan, dezî, yan şelte hatîye çêkirin , dan û pêdvîyên jiyanê di kine têda. :Cihalê kalê. Gonî. Telîs. Cewal. |
| **Cihanîn** | (k.jn.x.mê) Bi serûberkirin. Bi cî anîn. Berhevkirin. : Kar û erkê seyda gotî min, hemû bi cih anî. (K) bn : Anîn. |
| **Cihbûn** | (k.jn.l.mê) Bi mal û hal kevtin. Akincîbûn. Xwecihbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Cihdan** | (k.jn.l.mê) Dema dezgehek yan welatek cihî bi de mirovekî jibo jiyanê. |
| **Cihê** | (hn.x.çewa) Cuda. |
| **Cihêbûn** | (k.jn.l.mê) Cudabûn.(K) bn: Bûn. |
| **Cihêkerî** | (n.dar.mê) Cêkerî. Navçegerî. |
| **Cihêkirin** | (k.jn.l.mê) Cudakirin. (K) bn: Kirin. |
| **Cihêl** | (hn.x.çewa) Law. Xort. Genc. Tolaz. ***Pend*** :Cihêlî stirîyek bi dîve nûsya hay jê nebû.ang; cihêl di xwîn germin û hay ji xwe nînin. |
| **Cihêz** | (n.x.mê) Karûbarê bûkê. Pêdivîyêd bûkê. |
| **Cihgir** | (pîşn.l.dz) Cîgir. |
| **Cihgirî** | (karn.l.mê) Karê cêgirîye. :Ew dê bi karê cihgirî ra bi be tanî hevalê wî di vegere. |
| **Cihî** | (netew, x) 1. Dîneke( yehodî) 2. Neteyeke li axa Israyîl, ko welat, zimanê xwe heye. (Israyîl).***Pend*** :Cihîyê(cîyê) pîr nabit busilman.ang; mirov di jiyê mezin da zû hînî tiştî na be. |
| **Cihînan** | (k.jn.l.mê) Cihanîn. (K) bn: înan. |
| **Cihkirin** | (k.jn.l.mê) Bi cih kirin. Cih jibo peydakirin. Bi mal kevtin. (K) bn : Kirin. |
| **Cihkî** | (hn.dar.çewa) Di cih de. Di ciyê xweda. Xwecihî. |
| **Cihnav** | (n.l.nêr) ***rêzman***. Peyveke cihê navî di gire û li şûna navî bi kar di hêt., ez, em, tu, hûn, ew, ewan. Me, min, te, hewe, we, wan. |
| **Cihnişn** | (karn.l.mê) Birîkar. |
| **Cihû** | (netw.n.) Cihî. Cî. |
| **Cihûwar** | (n.l.nêr) Cîwar. 1ûnwar. |

| | |
|---|---|
| **Cihwar** | (n.l.mê) Cihûwar. |
| **Cihwarbûn** | (k.jn.gl.mê) Weke mirov li cihekî binîne jibo jiyanê. Akincîbûn. Rûniştin. (K) bn: Bûn. |
| **Cihwarkirin** | (k.jn.gl.mê) Dema yekî li cihekî akincî bi ken.:Rijêma jinavçûyî, kurd bi xurtî li jêrîya îraqê cihwar di kirin.(K) bn: Kirin. |
| **Cil** | (n.x.mê) 1. Parçe peroke sitûr ji hirî û patan dirist kirîye, liser pişta dewaran da dinin li bin yan ser kurtanî ji ber barkirinê dakoji pişta wan ne girint. 2. Cilikên mirov liber xwe di kin. Kinc. |
| **Cildanîn** | (k.jn.l.mê) Cil jiber xwe kirin. Xwe şelandin. Xwe rwîskirin. (K) bn: Danîn. |
| **Cildank** | (n.dar.mê) Dar yan singê cil hilawîstinê. Hilço. |
| **Cildirû** | (n.dar.mê) Mekîna dirûna cilikan. |
| **Cildirûvan** | (pîşn.l.dz) Kesê cilikan bi dest yan mekînê di dirût. |
| **Cildirûvanî** | (karn.gl.mê) Karê dirûna cilikan. |
| **Cilew** | (n.x.mê) Alaveke ji qayîşê dirist kirîye wek toreka şelal bi ser serê dewaran da di girin werîs yan kinifek pêveye bo girêdana wan yan zep kirin li dema siwarbûnê. |
| **Cilik** | .(n.x.pir) Perokên mirov li ber xwe di kin. Cilkên neteweyî. Cilikên olî. Cilikên xewê.Cilikên fermî. Cilikên leşkerî. :Cilikêd havînê, zivistanê neke berxwe. |
| **Cilîkan** | (nbiyan.x.mê) Dewlik yan amanê av têkirinê ji naylonî dirist kirîye. |
| **Cilşo** | (n.dar.mê) Mekîna şûştina cilikan. Amêrê şûştina cilan. |
| **Cinabet** | (n.x.mê) Cenabet. |
| **Cinawir** | (n.dar.nêr) Ginawir. Dirinde. |
| **Cincil** | (hn.dar.çewa) Mirîşkên per pinîpinî (gewir, boz , qehwayî).:Mirîşka me ya cincile. |
| **Cincilandin** | (k.jn.dar.mê) 1.Nazkirin. Dindilandin. Nazandin. : Te ev zaroke gelek yê cincilandî.2. Zelalkirin. Jaravkirin. Parzinîn. |
| **Cincilî** | (hn.dar.çewa) Zelal. : Ava cincilî ;ang ava zelal. |
| **Cincilîn** | (k.jn.x.mê) Parzinîn. Vavartin. |
| **Cinciqî** | (hn.dar.çewa) Cincil. Hemereng. Pirreng. |
| **Cinciqîkirin** | (k.jn.x.mê) Parzinîn. Zelalkirin. |
| **Cindar** | (n.dar.dz) evsane; Kesê destê ecinan digel da heye. Yê ku cinê wî hene. |
| **Cindî** | (hn.x.çewa) Xweşik. Rind. Ciwan. : Kurê apê min xortek cindî ye. |
| **Cinên** | (n.x.mê) Bexçe. Rez. Cinîk. |
| **Cingane** | (malbn.x.dz) Qereç. |
| **Cingir** | (n.dar.dz) evsane;Kesê ku bi ecinan re danûsitandinan di ke, û di gire. Xêvzank. |
| **Ciniqandin** | (k.jn.dar.mê) Tirsandin. Hesp cininqand. (K) bdn: ez di ciniqînim em di ciniqînîn, tu di ciniqînî hûn di ciniqînin, ew di ciniqîne[…it] ewan di ciniqînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di ciniqand, di ciniqandin. Db,dûr : ciniqandibû, ….bûn. (F) : bi ciniqîne, bi ciniqînin. |
| **Ciniqîn** | (k.jn.x.mê) Rawestaneka bi tirs. Di cihda rwesta ji tirsan. (K) Bdn. Ez di ciniqim em di ciniqîn , tu di ciniqî hûn di ciniqin, ew di ciniqe[…it] ewan di |

| | |
|---|---|
| | ciniqin. PR : dê [bi] + bdn. Bdb : di ciniqîm, di ciniqîn, di ciniqî,. db,dûr :Ciniqîbûm,…bûyn...bû.. bûn. (F) : bi ciniqe, bi ciniqin. |
| **Cinîk** | (n.x.mê) Baxê fêqî. Çem. Rez. Bax. Bîstan. :Cinîka pir hinar û zerdil. |
| **Cinûs** | (hn.x.çewa) Pîs. Gemar. Qirêjî. |
| **Cire** | (n.x .mê) Hevpeyvînên danûstandina bi toreyîve, dijwar, gerim. Gengeşa gerim. 1eredev. : Eve çi cireye hû di ken gelo?. |
| **Cirebir** | (n.dar.mê) Dijwarbûna cireyî. 1eredev. |
| **Cirecir** | (hn.dar.çewa) Dengûdor. Cirebir. |
| **Cireçûn** | [bi] cireçûn(k.jn.l.mê) Mirov dev di girin hev. 1eredev. : Hevsîyêd me yêd bi cire çûyn. (K) bn: Çûn. |
| **Cirekirin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov cireyî di kin. :Babê cire di gel kurê di kir. (K) bn: Kirin. |
| **Cirik** | (n.x.nêr) Kirmê armoşî. Qeska avirmîşî. |
| **Cirk** | (n.x.nêr) Dermanekê nîvrone, civre, jibo çavêd kul û birînan bi kar di hêt. Milhem. |
| **Civak** | (n.x.mê) Bireka mirovan di çand, ziman, tîtal û htd hevpişkin, bi hevre li cihekî kar û jiyana xwe di borînin û civakê pêk di hînin. Komelgeh.: Civaka Kurdistanê. |
| **Civakî** | (hn.dar.çewa) Kiryar û jiyana bi hevre. Tebayî.: Rewşa civakî. Çelengîyên civakî. Arêşeyên civakî. |
| **Civaknas** | (pîşn.dar.dz) Merivê pispor û şareza di warê zanîna civakî da. Zanayê karûbarên civakî. |
| **Civakzan** | (pîşn.dar.dz) Civaknas. |
| **Civakvan** | (pîşn.dar.dn) Civaknas. |
| **Civandin** | (k.jn.x.mê) Komkirin. Xirvekirin. :Xelik ê gundî bi civînin, dê seyda jibo wan bi axivit. (K) bdn: ez di civînim em di civînîn, tu di civînî hûn di civînin, ew di civîne [...it] ewan di civînin. Pr:dê+bdn. bdb : di civand, di civandin.db,dûr :civandibû, civandibûn. (F): bi civîne, bi civînin. |
| **Civat** | (n.x.mê) Komeka merivan. Bireka mirovan. Dîwan. Civa nûneran, civata bajêrvanîyê, civata pîran. |
| **Civatgeh** | (n.dar.mê) Cihê civat lê di rûnit. Jora kombûnan. |
| **Civatname** | (n.l.mê) Name yan berhevî ya civîna civatê ko têda şîret û boçûnên cihvatê hatîne nivîsîn û berhevkirin. |
| **Civatnişîn** | (k.jn.l.mê) Civîn. |
| **Civatok** | (n.dar.mê) Civateke biçûke ji çend kesan pêk di hêt, bi hevre danûstandinan di kin berî civata mezin bi cive. |
| **Civîn** 1 | (n.x.mê) Kombûna mirovan liser mijarekê danûsitandin di hêt kirin. Gengeşe, miştûmir bêt kirin.kombûn. |
| **Civîn** 2 | (n.x.mê) Axiftinên pûç. Birîdarkirin. Sixêf. Djûn. |
| **Civîndan** | (k.jn.l.mê) Xebergotin. Dijûndan. Sixêfîdan. |
| **Civînvan** | (n.dar.dz) Kesê ku li civînê amade dibit. Berhevbûyêd civînê. |
| **Ciwan** | (hn.x.çewa) 1. Xuşkok. Can. ***Pend*** :Ciwanîya liser ciwanîyê, ya bextreşe. ***Pend*** :Ciwanîya jinê nan nîne dê bixweyn .2. Xort. Law. Genc.3.Navekê du nivşe. |

| | |
|---|---|
| **Ciwanga** | (n.l.nêr) Canega. |
| **Ciwanî** | (n.dar.mê) 1.Xweşikî. Rindî. 2. Xortînî. |
| **Ciwankarî** | (n.l.mê) Kar têda kirîye tanî ciwan bûy.Karê ciwanîyê. |
| **Ciwankarîkirin** | (k.jn.l.mê) Karek ciwan têda hatîye kirin. Ciwankirin. |
| **Ciwankirin** | (k.jn.l.mê) Xweşikkirin. Peytkirin. Tazekirin. (K) bn: Kirin. |
| **Ciwanmêr** | (hn.l.çewa) Merivê hêja, mêrxaz. Zîrek. Peyt. Camêr. |
| **Cixare** | (n.x.mê) Cigare. |
| **Cixarekêş** | (n.l.dz) Cigarekêş. |
| **Cixarekişandin** | (k.jn.l.mê) Cigarekêşan. (K) bn: Kişandin. |
| **Ciyawaz** | (hn.dar.çewa) Cuda. Cihê. |
| **Ciyawazî** | (n.dar.mê) Cudayî. |
| **Cizdank** | (n.dar.mê) Tûrikeke ji çerim , naylonî , yan pateyî hatîye çêkirin, parey têda di parêzin. Peldank. Perdank. |
| **Cizme** | (n.x.mê) Cezme. |
| **Cî** | (netewen)1. Cihî(cihû). ***Pend*** :Cî kurê xwe quta hêşta cang bi avêda neçûy. Pend :Gotin cî da bi bim beheştê, got ; evro şembî ye. 2. (n.x.nêr) Cih.3. Nivîn.: Cîyê min liser banî dane. |
| **Cîgir** | (n.l.dz) Kesê li ciyê berpirsekî kar di ke dema ew ne amade be. Cihgir. Cêgir. |
| **Cîhan** | (n.x.mê) Cihê jiyana mirovan. Erdê ko em liser dijîn. Dunya. :Ev cîhane gelek a mezine. |
| **Cîhanger** | (pîşn.dar.dz) Kesê li cîhanê di gerit bo karên zanîn û aşkera kinina nepenîyan. , gerok. |
| **Cîhangîr** | {cangîr**}** (karn.dar.çewa) 1. Serwer. Serdar. Semyan . Deshelatdar.2 Navekê kudî yê zelamane. |
| **Cîhangîrî** | (n.l.mê) Serdarî. Serwerî. Semyanî. Globalizasyon. |
| **Cîl** | (n.x.nêr) Benîşt. |
| **Cîla** | (n.x.mê) Stirkeka nîseke jibo pêkvekirina darû kaxezan bi kar dihêt. |
| **Cîlakirin** | (k.jn.l.mê) Depekî, kaxezekê bi cîla, bi hêt Pêkvenûsan. (K) bn: Kirin. |
| **Cîn** | (nax.mê) Ref. bir . kûm. Gurop. Me xwe kir du cîn . |
| **Cînar** | (nl.dz) Kesên mal, kar, cihkarên wan bi rex êkve yan nêzîkî hev. Hevsî. |
| **Cînav** | (n.l.nêr) ***rêzman***. Cihnav. |
| **Cînosayd** | (nbiyan.x.mê) Qirkirin,a bi komel. Ferman. Pakkirna nejadî. |
| **Cîran** | (n.x.dz) Cînar. |
| **Cîwar** | (n.l.mê) Cihwar. |
| **Cîwarbûn** | (k.jn.l.mê) Cihwarbûn. |
| **Cîwarkirin** | (k.jn..lmê) Cihwarkirin.: Em bi xurtî li vir cîwar kirin!. |
| **Cîwe** | (n.x.nêr) Keresteyekê nîvrone, di nav gerimpîv î da heye. Zîbeq. |
| **CNK** | (kurt) Civata Nîştimanî a Kurdistanê(Perleman) li 1992 hat danî paş hilbijartinan, baregayê wê li Hewlêr e. |
| **Co** | (n.x.mê) Cihê av têra diçit. 1îvik. :Coya avê. :Coya xwînê. ***Pend***:Coya av lê neçûy, lê naçit. ang; kesê merdînî û mêranî ne kirî êdî nikare bike. |
| **Cobar** | (n.l.mê) Coya mezin. Rwîbarê biçûk . Coya rabûyî. |

| | |
|---|---|
| **Cobir** | (n.l.nêr) ***adî*** Candareke li bin erdî di nav bax û bîstanan dijît, co û malikên mitayî di bire. |
| **Codelîk** | (n.l.mê) Merş a li ser di rûnin. Gildik. Tatî. Merş. Doşeka tenik. |
| **Codî** | (cugin.x) Çîyayeke li Kurdistana Iraqê , devera Zaxo. |
| **Coga** | Co. |
| **Col** | (n.x.mê) 1. Bizav. 2. Zincîr. |
| **Colandik** | (n.dar.mê) Ciheke , werîsekî ducar dixin du tayên daran li hember hev, ko herdu tayên werîsî li rasta yek bin, perçeka tatîyan peroyen hindî cihî razana zaroyekî bi herdu alîyên tayên werîsî ve girê di din, mirov, nemaze zarok têda di razin û di hejînin. Dolîdank. |
| **Colandin** | (k.jn.dar.mê) Livandin. Hejandin. |
| **Colane** | (n.dar.mê) Colandik. |
| **Cole** | (n.x.mê) Livîn. Bizav. |
| **Colek** | (n.dar.mê) Bir. Celeb. Ker. Revde. |
| **Conî** | (n.x.nêr)1. Çalek di berî kolayî bi şêweyê lûleyî, danî tê di ken û bi berek lûleyî(desteconî) lê di din (di qutin) jibo cuda kirina dan û siviyê. 2. Navek kurane. |
| **Coqcoq** | (n.dar.dz) Elok. Elîşîş. |
| **Coqe** | (n.x.nêr) Birek mivên yek ast. Wek hev. |
| **Cor** | (n.x.nê) Reng. Teba. Awa. :Çi core cilikan tu hez jê di kî? |
| **Corbicor** | (n.dar.l.çewa) Gelek cor. |
| **Coş** | (hn.x.çewa) Gerim. |
| **Coşandin** | (k.jn.x.mê) Kelandin. Lênan. Gerimkirin. : Ezê xwarinê bi coşînim. |
| **Coşîn** | (k.jn.x.mê) Kelîn. Gerimbûn. |
| **Cot** | (hn.x.çewa) 1. Dû . Dudû.2. Hijmara cot(ne kit) dû çar, şeş,..htd.3. Kêlana zevî û erdan bi dewaran. |
| **Cotbûn** | (k.jn.l.mê) Giyandar di bin cot. Jinanîn. Kew bûne cot. (K) bn: Bûn. |
| **Cotik** | (n.dar.nêr) 1.Du tişt bi hevra.2. Pênlêdana dewran. :Cotikek lêda.ang ; pêhinek lê da. |
| **Cotkar** | (karn.l.dz) bn;Cotyar. |
| **Cotkarî** | (n.l.mê) Karê cotkaran. |
| **Cotkirin** | (k.jn.l.mê) 1.Kêlana zevîyan bi dewaran. : Cotyar ê cotî di ke2. Bûne cot. . Tilîyê xwe kirin cot. (K) bn: Kirin. |
| **Cotmeh** | (demn.l.mê) Meha dehê. |
| **Cotyar** | (n.dar.dz)1. Kesê karê cot û kêlan di ke. Kesê zevî, çem û rezan di kêle.2. kesê pîşeya wî çandin bit. 3. Navê mêrane. |
| **Cotyarî** | (karn.l.mê) Cotkarî. |
| **Coxîn** | (n.dar.mê) Bênder. Bêder. |
| **Coxînan** | (hk.dem,n.dar.) Meha heftê. Meha duwê ji havînê. Tîrmeh. |
| **Cozerdan** | (nl.mê) Cehzeran. Xizîran. |
| **CTN** | (kurt) Kurtkirîya ; Civata Tenayîya Navneteweyî, rêkxistîyeka navneteweyîye erkê bi hev ra jiyan û parastina tenayîya welatên endam û cîhanê bi stoyê xwe ve di girît. |

| | |
|---|---|
| **Cuda** | (hk.x.çewa) Tiştê ne bi hevra. :Em û ew ji hev cudane. |
| **Cudabûn** | (k.jn.l.mê) Dema mirov ji hev dûr di kevin. :Bira ji hev cudabûn ; ang : bûn du mal. (K) bn : Bûn. |
| **Cudakirin** | (k.jn.l.mê) Ji hev vekirin. Ji hev dûrxistin. :Hindî ez di hêm nikarim wan du cêmikan ji hev cuda bi kim. :Cotyarî genim û ka jêk cuda kirin. :Pareyên hûr gir ji hev cuda ke. (K) bn : Kirin. |
| **Cudayî** | (hn.dar. çewa) Ne wek hevî. Ne wek yek. :Ez bê cudayî li wan di nêrim. |
| **Cudayîkirin** | (k.jn.l.mê) Mirovkanêkirin. Tagirîkirin. :Nabit cudayî di navbera zarokan da bi hêt kirin. (K) bn: Kirin. |
| **Cuhî** | (nej.n) Cihû. |
| **Curd** | (n.x.nê) ***candar*** Core mişkekê mezine. Geklek reng û cor hene. |
| **Curf** | (n.x.mê) Tirsek ji nişkav. Lût. |
| **Curfvêkevtin** | (k.jn.gl.mê) Dema ji xafilkî ve dengek têt mirovî û lûtek bi mirovî di kevit. : Kewek ji nişkê ve firî, curfek bi gavanî kevt(keft). (K) bn:Kevtin. |
| **Curne** | (n.x.mê) Birkeka biçûke ya vegirtina avê. Destşû. |
| **Cuwan** | (hn.x.çewa) Ciwan. |
| **Cûbirk** | (n.l.nêr) Cobir. |
| **Cûce** | (hn.dar.çewa) Biçûk. Hûrik. Çikune. |
| **Cûcik** | (n.dar.mê) Têjikên çûçikan. |
| **Cûn** | (k.jn.l.mê) Hûrkirina zadî bi diranan. Parî di cûm.(K) ez di cûm, em di cûn, tu di cûy hûn di cûn. Bi cû, bi cûn. |
| **Cûre** | (n.x.mê) Cor. |
| **Cût** | (n.x.mê) Hijmarên cût, du, çar, .. deh, û htd. |
| **Cûtin** | (k.jn.x.mê) Dema mirov yan candar xwarinê di devê xweda bi didanan di hêrin. |

## Ç

| | |
|---|---|
| **Ç** | (çe) Pîta çarê ji abeya kurdî. |
| **Ça** | (n.x.mê) 1.Giyayeke belgên wî, hişik di ken digel ava kelandî têkel di kin , piştî rengê sor werdigire di kin kopan, yan peyalan di gel şekirê têkve di din vedixwen. |
| **Çadir** | (n.x.mê) Nîhanîyek ji perokan hatî diristkirin wek xanî tê bi kar anîn. Xîvet. Reşmal. Kon. |
| **Çadirgeh** | (n.dar.mê) Cihê çend çadir lê hatî vedan. Xîvetgeh. :Eve çadirgeha penaxwazane. |
| **Çadirvedan** | (k.jn.l.mê) Danan û peytkirina çadirê dako wek mal bi kar bi hînin, jibo di nav da jiyanê. :Me çadira xwe liserê girî veda. Kî yê şarezaye jibo çadirvedanê?. (K) bn:Vedan. |
| **Çak** | (hn.x.çewa) Baş. Qenc. Hêja. :Mirovêd çak ji dinyayê qir nabin. |
| **Çakbûn** | (k.jn.l.mê) Başbûn. Qencbûn. : Piştî vexwarina dermanî ez çak bûm. (K) bn: Bûn. |
| **Çakêt** | (n.x.nêr) Qutik. Qemsele. |
| **Çakî** | (n.dar.mê) Başî. Qencî. |
| **Çakîkirin** | (k.jn.l.mê) Başî, qencî kirin. ***Pend*** :Çakîyê bike, bila di ber avêda biçe. (K) bn: Kirin. |
| **Çakkirin** | (k.jn.l.mê) Başkirin. Çêkirin. Peytkirin. :Text çk kir.:Pora xwe çak di ke.(K) bn: Kirin. |
| **Çakuç** | (n.x.nêr) Amêreke jibo mîxkirin yan derînana mîxan(bizmaran) ji dar, dep, text û htd bi kar di hêt. |
| **Çakuçlêdan** | (k.jn.l.mê) Bikar anîna çakuçî jibo girêdê. Lêxistin bi çakuçî. :Çakuçek li mîxê da. :Dengê çakuçlêna asingirî di gehişt serê kolanê. |
| **Çal** 1 | (n.x.mê) 1. Kûratîyeke di erd yan her cihekî da. :Çala genimî.:Çala befrê. 2. Pîlan. Bê bextî. ***Pend*** :Yê çalê bo êkî bikolit,ew bixwe dê kevitê. |
| **Çal** 2 | (hn.x.çewa) Kewalên xaleka sipî li enîya(navbera çavêd) wan heye, mirovê tewleka sipî li enîya wî. :Bizina çal. :Karika çal. |
| **Çalak** | (pn..x.çewa) Çeleng. Zîx. Peyt. Bi bizav. :Serdar qutabîyekê çalake. |
| **Çalakî** | (n.dar.mê) Bizav. : Çalakîyên meha gulanê yêd bingeha me ji hemû mehan pitirin. |
| **Çalav** | (n.l.mê) Çala av tê kom di be. Bîr. Birk. |
| **Çalbûn** 1 | (k.jn.l.mê) Weke çalek di erdekê ve bibit. : Cihê guletop vê kevtî yê bûye çal.(K) :Bûn. |
| **Çalbûn** 2 | (k.jn.l.mê) Xaleka sipî li hindav çavan çêbûye. (K) bn : Bûn. |
| **Çaldêran** | (cugraf,ndar.mê) Deverk kurdîye. Peymana bi nave çaldêran ko li vî cihî hatibû girêdan û cara êkê Kurdistan du parçe kirî navbera Osamanî û Sefewîyanda, sala 1814 . |
| **Çaleke** | (n.dar.nêr) ***candar*** Qurbeşk. |

| | |
|---|---|
| **Çalepk** | (hk.dar.çewa) Dema zaro liser lep û çokên xwe bi rê di çe. |
| **Çalepkaçûn** | (k.jn.gl.mê) bi çalepka, Zaro bi çalepka di hêt û diçit. :Keça wî jinû bi çalepkan bi rêve di çit.(çarlep). |
| **Çalkirin** 1 | (k.jn.l.mê) 1.Dema mirov çalekê li cihekî bike.: Te vêrê jibo çi çal kirîye?. 2. Dagirtina çalan bi mitayî. : Berî çalkirin.:Befir çal kir. |
| **Çalkirin** 2 | (k.jn.l.mê) Dema hindav çavên kewalan yan mirovî, xaleka sipî lê bi hêt nîgarkirin. (K) bn : Kirin. |
| **Çalkirî** | (hk.l.çewa) 1.Mitayê di çlan da hatî hilgirtin. : Genimî çalkirî.2. Xala sipî li enîyê hatî kirin. |
| **Çam** | (n.x.mê) Bûyerên kovandar. Femran. Kujtina bi komel. Tengavîyên mezin. Serpêhatîyên nexweş.:Dujminî çamên mezin anîn serê kurdan. |
| **Çand** | (n.x.mê) Rewşenbîrî. Ronakbîrî. Keltor. :Wezareta çandê ya hikometa Kurdistanê. |
| **Çandayî** | (hn.dar.çewa) Çandî. |
| **Çandin** | (k.jn.x.mê) Tov, nemamik, ta, serik yên giya û daran binax di kin jibo hişîn bibin. ***Pend*** : Cotyaro çî di çînî, go heger hişîn bû dê bînî. : Kesê bi xwaze çakîyekê jibo mirîyê xwe bi ke bila darekê bi çîne.şîreta pêxember,Zeredeşt( s.x). (K) bdn: ez di çînin, em di çînîn, tu di çînî hû di çînin, ew çîne[…it] ewan di çînin. Pr:dê [bi] + bdn. Bdb : di çand, di çandin. Db,dûr: çandibû, … bûn. (F) : bi çîne, bi çînin. |
| **Çandî** | (rd.dar.çewa) Mijarên rewşenbîrî. :Çelengîyên çandî. :Werzên çandî. :Bizava çandî. |
| **Çante** | (n.x.nêr) Tûrik. Cihor.Cante. |
| **Çap** | (n.x.mê) Makîna(amêrê) nivêsîna pertokan. |
| **Çapan** | (n.x.mê) Core perokek sipîye. Nifsî. Cang. |
| **Çapez** | (n.dar.nêr) Çaydank. Qorik. |
| **Çapker** | (karn.dar.dz) Kesê ko liser çapê kar di ke. |
| **Çapkirin** | (k.jn.l.mê) Nivêsîna bi tîpên makînê, çapê.tîpkirin. :Kitêba wî hêjta ne hatîye çapkirin. :Bê zehmet vê nivîsarê çap bi ke !.(K) : Kirin. |
| **Çapxane** | (hk,n.dar.mê) Xanîyê ,cihê nivêsîna pertokan. Cihêt tîp kirinê .We_anxane. :Çapxaneya xebat. |
| **Çaq** | (n.x.nêr) Çeq. |
| **Çaqrût** | (hn.l.çewa) Hejar. Rût. Belingaz. |
| **Çaqû** | (n.x.mê) Kêrik. Kêr. |
| **Çar** | (hijn.çend) Hijmara 4. 2+2=4. :Çar parçeyên Kurdistanê. |
| **Çarbaz** | (n.dar.mê) Çargav. |
| **Çarbazî** | (n.dar.mê) Beza çargavê ya hespan. |
| **Çarçabik** | (n.dar.mê) Gavek. Demek kurt. Pêngav. |
| **Çarçef** | (n.dar.mê) Pateyekê ciwan û çargujî yan lakêşe bi ser text û nivînan da di kêşin. |
| **Çarçira** | (hk.cih,devern.l.mê) Meydaneke li bajêrê Mihabad-Kurdistana Iranê, ko serokê komara kurdistanê Q. Mehemmd, lê hatîye li sêdaredan. |
| **Çarçûv** | (n.dar.nêr) Delîve. Dem. War. |

| | |
|---|---|
| **Çarde** | (hijnçen.l) Hijmara 14. |
| **Çardeh** | (hij,n.l) Çarde. |
| **Çardehemîn** | (hijn,rêzkir.l) Ya/ yê çardehê. |
| **Çardest** | (hn.l.çewa) Dema mirovek ji nişkêve nexweş di be, yan bêhoş dibe, xelik bi desatan radikin di gehînin cem nojdarî. :Dilê mamê min hat girtin, me bi çardestî gehand nexweşxanê. |
| **Çare** | (n.dar.mê) Dawî înana her karekî bi serferazî, serkeftî. Jibo qurtalbûn ji vê tengavîya em têda tu çare nînin. |
| **Çarekirin** | (k.jn.l.mê) Başkirin. Nojkirin. Saxkirin. Qurtalkirin. : Supas bo xudê me arêşe çare kir. (K) bn: Kirin. |
| **Çarem** | (hijn.rêzkkirin.çend) Ya/ yê çarê. |
| **Çaremîn** | (hij,rêzkirin.çend) Ya/ yê çarê. |
| **Çarenivîs** | (n.l.nêr) Paşeroj. : Çarenivîsê hizaran kurdên enfalkirî ne diyare. |
| **Çareser** | (n.dar.mê) Çare. |
| **Çareserbûn** | (k.jn.l.mê) Çarebûn. Çêbûn. Çakbûn. :Heger tu cigaran ne hêlî çi caran çareser nabî !. |
| **Çareserî** | (n.dar.mê) Çare.:Nojdar mijîlî çareserîya nexweşî ye. |
| **Çareserkirin** | (k.jn.l.mê) Çarekirin. :Hêjta arêşeya wan ne hatîye çareserkirin. (K) bn:Kirin. |
| **Çarêk** | (hijn.çend.l) Pişkek ji çaran ¼. :Çarêka demhijmêrekê ez li benda te mabûm. |
| **Çargav** | (n.l.mê) Xara dewaran bi çar lingên xwe. :Hesp bi çargavê navdenge. |
| **Çargavkirin** | (k.jn.l.mê) Dewarê xarê di ket. :Bi nêre kerê henê, yê çargavê di ke!. (K)bn: Kirin. |
| **Çargoşe** | (n,endaz.l.mê) bn :Çarkujî. |
| **Çarhizar** | (n.hijnl.çend) Hijmara 4000. |
| **Çarik** | (n.dar.mê) Hîşar. Dersoka jinan. Pêçe. |
| **Çarîn** | (n.dar.mê) Ji çar rex, bend, risteyan pêkhatîye. |
| **Çarkinar** | (n.l.mê) Çar alî yan sentên cihanê, Bakûr, başûr, rohilat û rojava. Çarrex. |
| **Çarkindêle** | (n.dar.mê) Silka şekirê. Qilindir. |
| **Çarkujî** | (n.l.mê) ***endaze*** Qêweyên endazeyî ko çar kujîyên wekhev hene. |
| **Çarlep** | (n.l.mê) Çalepk. |
| **Çarlepkî** | (hk.l.çewa) Çûna zarokan bi çalepkan. |
| **Çarmedor** | (n.l.mê) Dormandor. Rexûçan. Dewrûber. Hawirdor. |
| **Çarmêrkî** | (hk.l.çewa) Rûniştina li erdî dema mirov lingên xwe di çemîne di binêk ra di be. Çarmêvankî. |
| **Çarmilyon** | (hijn.çend.l) 4000000.Çar milyûn. |
| **Çarmîx** | (n.l.mê) Du xîçêd diser yekra derbazbûyîn. Çarriyan. |
| **Çarneçar** | (hn.l.çewa) Arêşeyên nîvbero mayîn û ne hatîn çarekirin. Bêrê. |
| **Çarnîk** | (hn.dar.çewa) Mirovê xwedî serbor. Qareza. Zana. |
| **Çaroke** | (n.x.mê) Hîşara jinan. Dersoka jinan. |
| **Çarpare** | (hn.l.çewa) Tiştê hatî parkirin, parçekirin, bûye çar pirt. |

| | |
|---|---|
| **Çarparebûn** | (k.jn.gl.mê) Pirtbûn. Perçebûn. (K) bn: Bûn. |
| **Çarparekirin** | (k.jn.gl.mê) Pirtikandin. Hincinandin. (K) bn: Kirin. |
| **Çarpê** | (hn.l.çewa) Candarên liser çar dest û pêyan diçin, mîna hesp, ker, bizin û htd. |
| **Çarrex** | (n.l.nêr) Çaralî. |
| **Çarrê** | (n.l.mê) Çarrîyan. |
| **Çarrîyan** | (nkcih.mê) Çar rêyê di berêk yan serêk ra di bûrin. |
| **Çarhizar** | (hijn.l) Hijmara 4000. |
| **Çarmilyon** | (hijn.l) Hijmara 4000,000 |
| **Çarsed** | (hijnl.çend) hijmara 400. |
| **Çarşemb** | (demn.l.mê) Rojeka heftîyê. Roja navbera sêşmb û pêncşembê . |
| **Çaryek** | (hijn.çend) Çarêk. |
| **Çatir** | (n.dar.mê) Catir. |
| **Çav** | (n.x.nê) ***hedam*** Endamên dîtinê yên giyandarane**. *Pend*** :Çav lêkerî xwelîya serî.***Pend*** :Çavên li derê, bi hên derê. ***Pend*** :Çavên pîs û jehir a marî, weko yekin bi karî. ***Pend*** :Çav kanîka kilîne.***Pend***:Çavekê te kure bû, yê dî kure neke.***Pend*** :Çavan dijminê xo di nasin.***Pend*** :Dîtna çavan, sotina hinavan. ***Pend*** :Dîtina çavan direwe. ***Pend*** :xwe bi çav û dev havêtê, ang : dema mirovî karek bi çavtarî di vêt bi ket. |
| **Çavbarenegirtin** | (k.jn.gl.mê) Çavpênerabûn. :Ew çavabare na gireko birayê wî ji wî zîrek tire. |
| **Çavbelek** | (hn.l.dz.çewa) Çavên ciwan û sipîlik sipî û reşik pir reş yan rengên din. : Çavên reş û belek. |
| **Çavberdan** | (k.jn.l.mê) Dema meriv li yekî/ yekê hûrik bi nêre. Çavliderî. Tema_ekirin.: Wî çavê xwe berdaye ser keça mamê xwe. |
| **Çavbiloq** | (hn.l.çewa) Mirovê çavên wî mezin û derkeftî. |
| **Çavbirçî** | (hk.l.çewa) Çavbirsî. Dinyanedîtî.:Çi Jineka çavbirçî ye,ji malê dinê têr nabe !. |
| **Çavbirçîtî** | (n.l.mê) Çavbirsîtî. Çavtarî. |
| **Çavçilûs** | (hk.dar.çewa) Mirovê dinyanetîtî. Hefhefî. Kirêt. Çepel. |
| **Çavçilûsî** | (n.dar.mê) Hefhefî. Kirêtî. Herimî. |
| **Çavdamilandin** | (k.jn.l.mê) Pêşdem zanîn. Pêşbînîkirin. |
| **Çavdan** | (k.jn.l.mê) Sexbêrî. Sexbêrîkirin. Xwedîkirin. Nêrîn. :Ez bextê teme çavê xwe bide mal tanî ez di zivirim. (K) bn: Dan. |
| **Çavdar** | (pîşn.dar.dz) Çavdêr. |
| **Çavdarî** | (karn.dar.mê) Çavdîrî. |
| **Çavdarîkirin** | (k.jn.gl.mê) Sexbêrkirin. Xwedîkirin. Xudankirin. Pûtedan. (K) bn: Kirin. |
| **Çavdêr** | (pîşn.dar.dz) Kesê çavê xwe di dit candaran, rez û baxan, mirovan û htd. Sexbêrker.Zêrevan. Nêrevan. |
| **Çavdêrî** | (karn.dar.mê) Sexbêrî. |
| **Çavdêrîkirin** | (k.jn.gl.mê) Çavdarîkirin. : Ew çavdêrîya rezî di ke. (K) bn:Kirin. |
| **Çavenî** | (hk.l.çewa) Navçavgirê. Posîde. |

| | |
|---|---|
| **Çaverê** | (hn.l.çewa) 1. Kesê li benda mizgînekê,bûyerekê bi mine. 2. Navê jin û mêra ne. |
| **Çaverêbûn** | (k.jn.gl.mê) Li bendê man. Li hîvîyê man. : Ez duh demhijmêrekê çaverê te bûm, lê tu nehatî ?. (K) bn : Bûn. |
| **Çaverêkirin** | (k.jn.gl.mê) Li bendê man. Li hîvîyê man. : Tu çaverêy çi dikî, êdî ew nahêt (nema tê)?. (K) bn: Kirin. |
| **Çavêş** | (hn.l.çewa) Mirovê çavên wî di êşin. |
| **Çavêşan** | (k.jn.l.mê) ***derd*** Êşana çavan. Çavêşana te ne ya başe, here cem nojdarekî!. :Çavên min ji mê di êşin. |
| **Çavêşî** | (n.l.mê) Êşana çavan. Çavkulî. |
| **Çavgirêdan** | (k.jn.l.mê) 1. Core listokeke çavên mirovî girê di din. 2. Xapandin.:Çav lê tarîkirin. (K) bn: Girêda. |
| **Çavgirêdayî** | (hk.l.çewa) Mirovê di serda birî. Mirovê xapandî. |
| **Çavhar** | (hk.l.çewa) Çavhîz. Çavdijwar. |
| **Çavhavêj** | (hk.l.dz.çewa) Mirovê çavan li tiştî di dit.:Hişyar be lizarokên xwe, jiber çavhavêjan. |
| **Çavhavêjtin** | (k.jn.l.mê) Çavlêdan.:Ev pîrejine çavan di havêje. (K) bn: Hvêtin. |
| **Çavhîz** | (hn.l.çewa) Çavlider. |
| **Çavik** | (n.dar.mê) 1. Cîhê av jê di hilavêjit. Serekanî. Çavkanî. 2. Berçavik. |
| **Çavîn** | (hk.dar.çewa) Karê bi çavan di hêt kirin. |
| **Çavînbûn** | (k.jn.l.mê) Hatî çavînkirin. |
| **Çavînkirin** | (k.jn.l.mê). Hin mirov temaşayî kesek, zaroyek xweşikbi kin di bit egera nesaxbûn yan kujtina wî. Têkdana mal, kargeh û htd.Bi çavan karkirin ser mirov, candar tiştan. (K) bn: Kirin. |
| **Çavkanî** | (n.l.mê) Serekanî. Jêder. |
| **Çavkirin** | (k.jn.l.mê) 1. Dema mirovê çavê xwe li êkî bi neqînit. 2. Bi çavkirin; ang destnîşankirin. (K) bn: Kirin. |
| **Çavlêbûn** | (k.jn.gl.mê) Weke çavê mirovî li kesek, candarek yan tiştekî be. Pûtepêdan. : Sube ez dê herin seredana hevalekî, çavê te li zarokan be.Çavê min lê bû dema ew ji mal derkevtî. (K) bn: bûn. |
| **Çavlêdan** | (k.jn.gl.mê) Çavînkirin. Êkî çavek li kurê min daye, eve çend roje yê nexweşe (K) bn: Lêdan. |
| **Çavlêgerandin** | (k.jn.gl.mê) Lêgeran. Lênêrîn. Temaşekirin. : Hindî çavên xwe lê di gerînim, yara xwe li çi deran nabînim. (K) bn: Gerandin. |
| **Çavlider** | (hk,hn.l.çewa) Yê berê xwe dide jinên xelkî. Yan mineta xelkê dî hildigirît. |
| **Çavliderî** | (n.l.mê) Mirovê li benda alîkarîya biyanîyan. ***Pend*** :Çav li derî, xwelîya serî. |
| **Çavnebar** | (hk,hn.l.çewa) Dilpîs. Kumreş. Zikreş. |
| **Çavnebarî** | (n.l.mê) Dilpîsî. |
| **Çavnebarîkirin** | (k.jn.gl.mê) Kumreşî, dilpîsî kirin. (K) bn: Kirin. |
| **Çavnêr** | (pîşn.dar.dz) Çavdêr. Zêrevan. |
| **Çavnêrî** | (karn.dar.mê) Çavdêrî. Zêrevanî. |

| | |
|---|---|
| **Çavnêrîkirin** | (k.jn.gl.mê) Çavdêrîkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Çavniq** | (hn.dar.çewa) Yê ku qencîyan zû ji bîr bike. ***Pend*** :Kitika çavniq.ang; kitika pîştî têr di xwe, çavên xwe di niqîne , qencîya xwedî xwe jibîr di kit. |
| **Çavniqandin** | (k.jn.l.mê) Weke mirov çavên xwe ,daneser hev, bigire. Biniqîne. (K) bn: Niqandin. |
| **Çavpêkefitin** | (k.jn.l.mê) Hevdîtin. Gehiştin hev. :Çîya bi çîya nakevin, lê çav bi çavan di kevin.(K) bn: Keftin. |
| **Çavpirpîç** | (hn.l.dz.çewa) Mirovê ku çavên wî di bê serûber bin. |
| **Çavreş** | (hn.l.dz.çew, n.l) 1. Mirovê ku rengê çavên wî di reşin. 2. Navek kurdîye. |
| **Çavreşî** | (n.l.mê) Dilpîsî. Kumreşî. Çavnebar. |
| **Çavron** | (hnl.çewa) Mirovê çavên wî di ronin û tiştan baş di bînit. |
| **Çavronbûn** | (k.jn.gl.mê) Dema kesek xweşdivîyekê xwe di bîne bîne yan ji wexereka dûr bihêt, xelik daxaza dilxweşîyê jibo dike, di bêje ; êavên te ron bin. (K) bn: bûn. |
| **Çavronkirin** | (k.jn.gl.mê) Qadbûn. : Te çavên me ronkirin ku tu bi silmetî vegeray mala xwe. (K) bn: kirin. |
| **Çavsivikî** | (n.l.mê) Bêrêzî. Sivkatî. |
| **Çavsor** | (hn.l.çewa) Tore. Hêris. : Bapîrê min çavsore!. |
| **Çavsorbûn** | (k.jn.gl.mê) Torebûn. Hêrisbûn. :Hêjta çavêd min sor be bûne!. (K) bn: Bûn. |
| **Çavsorî** | (n.l.mê) Hêrisbûn. Tingijîn. Toreyî. ***Pend*** : Çavsorî jibo gayî nabit. |
| **Çavsorkirin** | (k.jn.l.mê) Torekirin. Hêriskirin. (K) bn: Kirin. |
| **Çavşaş** | (hn.l.çewa) Çavwir. Çavhewêl. Xêl. Çavtirîwar.Vîr. |
| **Çavşikandin** | (k.jn.l.mê) Mirov gurzekî li êkî bidit, ko çi caran ji bîr neke. Tirsandin. Paşvebirin. (K) bn: Qikandin. |
| **Çavşikestî** | (hn.l.çewa) Kesê hatîye tirsandin û dema ew bûyer li bîra wî di hêt, ji xwe fedî di ke. |
| **Çavşîn** | (pn.l.çewa) 1. Mirovê çavên wî di _în bin. 2. Navê jin û mêrane. |
| **Çavşor** | (hk.l.çewa) Serşor. Pûç. Bêzax.: Ew kabirayekê çavşore, bila tu kes têkelîya ne ket. |
| **Çavşorbûn** | (k.jn.l.mê) Serşorbûn. Vehêtbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Çavşorî** | (n.l.mê) Serşorî. Bêzaxî. Ta kengî dê bi çavşorî bi jîn ?. |
| **Çavşorkirin** | (k.jn.l.mê) Serşorkirin. Ji fehêtîyan çavêt xwe şer di ket. (K) bn: Kirin. |
| **Çavtarî** | (hn.l.çewa) 1. Kesê ronahîyê baş nabîne, jiber ko çavên wî di lewazin.2. Dinyanedîtî. Hefhefî. |
| **Çavtarîbûn** | (k.jn.gl.mê) 1.Dema çavên mirovî lewaz di bin û êdî baş nabînin. 2. Dema mirov tore di be yan di tirse çav tarî dibin. (K) bn: Bûn. |
| **Çavtarîkirin** | (k.jn.gl.mê) Weke mirov tiştek yan gotinek nexweş bi bihîzit, çav dihên tarî kirin. : Hindî Azadî yê bi lez bû çav li min tarî kirin, min jibîr kir pisyara babê wî bikim. (K) bn: Kirin. |
| **Çavteng** | (hn.l.çewa) Çirîk. |

| | |
|---|---|
| **Çavtengî** | (n.l.mê) Çirîkî. |
| **Çavtêr** | (hn.l.çewa) Merivê merd û dinyadîtî. Mirovê nandeh. |
| **Çavtêrî** | (n.l.mê) Merdînî. Nandehî. |
| **Çavtirsandin** | (k.jn.l.mê) Dema mirovek bihêt tirsandin û hertim tirs di dilê wî da be. (K) bn: Tirsandin. |
| **Çavtirsandî** | (hn.l.çewa) Mirovê tirs dîtî, her di dilî da mayî. |
| **Çavvekirin** | (k.jn.l.mê) 1. Mirov çavên xwe yên niqayî, veke.2. Hatin ser dinyayê. Ji daykbûn. Peydabûn. |
| **Çavvekirî** | (hk.l.çewa) Mirovê hez ji mêvan û hevalan di ket û xwarin û perey di mezêxit jibo dinyadarîyê. Merd. Nandeh. Dinyadîtî. |
| **Çavxwînbûn** | (k.jn.gl.mê) Jiber kerb û torebûnê çavên mirovî mîna xwînê sor di bin. |
| **Çavzêlk** | (hn.dar.çewa) Kesê di xwaze her tiştî bi zane. Davdoz. |
| **Çavzêlkî** | (n.dar.mê) Heza mirov jibo zanîna her tiştî. |
| **Çavzil** | (hn.l.çewa) Mirovê çavên wî di zilin. Çavzîq. |
| **Çavzilbûn** | (k.jn.gl.mê) Dema çavên mirovî jibo dîtina tiştekî gir û vekirî di mînin. (K) bn: Bûn. |
| **Çavzilkanê** | (n.l.mê) Yarîyeke, du kes hember hev di rawestin û çavên xwe zil di kin, kanê kî dê bi kare pitir çavên xwe bi hêle vekirî ew dê bi serkeve. |
| **Çavzilkirin** | (k.jn.gl.mê) Dema mirov çavên xwe zil dike ji egera bihîstin yan dîtina tiştekê seyr. (K) bn: Kirin. |
| **Çavzîq** | (hn.l.çewa) Yê çavên xwe jiber bûyereka seyr vediket, mezin diket û çavên wî di teysin. |
| **Çavzîqbûn** | (k.jn.gl.mê) Çavzilbûn. (K) bn:Bûn. |
| **Çavzîqkirin** | (k.jn.gl.mê) Çavzilkirin. (K) bn:Kirin. |
| **Çawa** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pirsînê. Çewa. :Çawa dê wesa bi be?. Hûn çawanin?. Rengê esmanî yê çawane?. |
| **Çax** | (hk.dem) Dem. Wext. Gav. :Çaxê berê, ne wek vî çaxî bo!. |
| **Çay** | (n.x.mê) ***giya***, ***vexwarin*** Ça. |
| **Çayçî** | (karn.dar.dz) Kesê çayê çêdikit li ber çayxanan . |
| **Çaydan** | (n.dar.nêr) Çapest. Qorî.:Ça di çaydanî da di kelit.:Çaydankê asinî. |
| **Çayxane** | (n.l.mê) Xanîyê bêhinvedana xelik î, cihê ko çayê lê çê diken û di firoşin. |
| **Çeç** | (n.x.nêr) Nazikkirina destîye bi zarê zarokan. |
| **Çejtin** | (k.jn.x.mê) Tamkirin. |
| **Çek** | (n.x.nêr) 1. Amêrên şerkirinê;mîna top, tiveng, demance û htd. 2. Zêrên jinan, ristik. Guhark,.htd. |
| **Çekçekîle** | (n.dar.nêr) ***giyandar*** Candarek şîrdere, firindeye bi şev çelenge. şevkork. ***Pend*** Çekçekîle ne şevê di dîyarin, rojê di berzene.ang; kesê herdem ne diyar. |
| **Çekçekûle** | (n.dar.nêr) Çekçekîle. |
| **Çekçemêjok** | (n.dar.nêr) Çekçekîle. |
| **Çekdanan** | (k.jn.l.mê) Dema mirov çekê xwe di danit. : Me soz daye em çekî jibo dujminan ne danin. (K) bn: Danan. |

| | |
|---|---|
| **Çekdanîn** | (k.jn.l.mê) Çekdanan. (K) bn: Danîn. |
| **Çekdar** | (pîş.dar.dn) Mirovê çekî hil digrit. Leşker.Xudan çek. Brx Bêçek. |
| **Çekadarî** | (kn.dar.çewa) Karê bi çekî di hêt kirin. Çalakîyên çekdarî. şoreşa çekdarî. |
| **Çekxane** | ( n.dar.mê) Cihê lê danîna(hilgirtina) çekan. Cebilxane. |
| **Çel** | (n.x.nêr) Çelake. |
| **Çelake** | (n.dar.nê) Darekê dirêje dawîya wî çuklek xar pêveye bo girtina tiştî; wek çinîna mazî, gûz û htd, bi kar di hêt. |
| **Çelem** | (n.x.mê) Kelemî. |
| **Çeleng** | (hn.x.çewa) 1. Çalak. Zîx. Peyt. 2 .Bedew. Rind. Ciwan.:Qutabî yê çeleng. |
| **Çelengî** | (n.x.mê) Çalakî.:Me liber çend çelengîyêd ronakbîrî li meha gulanê bi keyn. |
| **Çelê** | (cugir) Bajarekê Kurdistana bakûre. |
| **Çeliqandin** | (k.jn.x.mê) Jêk vekirin. Dar çeliqand. (K) bdn: ez di çeliqînim em di çeliqînîn, tu di çeliqîn hûn di çeliqînin, ew di çeliqîne[..it] ewan di çeliqînin.Pr: dê bi + bdn. Bdb: di çeliqand, di çeliqandin. (F): bi çeliqîne, bi çeliqînin. |
| **Çelitandin** | (k.jn.x.mê) Tîvkil di serda înan. Sipîkirin. Selixandin. |
| **Çelitîn** | (k.jn.x.mê) Selixîn. Çerim di serda çûn. |
| **Çelixt** | (n.x.mê) Cihê êvitî. Werim. |
| **Çelkew** | (n.dar.dz) Têjikên kewan. Têjkewk. |
| **Çelkê** | (cugirn) Gundekê kurdane li Kurdistana Iraqê. |
| **Çelp** | (n.x.mê) Dengê lemçêna devî li dema xwarinê. : Çelpeçelp. |
| **Çelqandin** | (k.jn.x.mê) şilqandin. |
| **Çelqîn** | (k.jn.x.mê) şilqîn. |
| **Çem** | (n.x.nêr) 1. Cinîk. Baxê fêqî. Rez. 2. Rîbar. Robar. |
| **Çemandin** | (k.jn.x.mê) Xwarkirin. Tewandin. : Serê xwe çemand ji fedîyan de. ***Pend*** :Asin bi sarî çemandin.ang; bi hêz û şiyane. (K) bdn : ez di çemînim em di çemînîn, tu di çemînî hûn di çemînin, ew di çemîne[..it] ewan di çemînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di çemand, di çemandin. Db,dûr: çemandibû, …. Bûn. (F) : bi çmîne, bi çemînin. |
| **Çemandî** | (kn.dar.çewa) Tiştê hatî çemandin. Tewandî. Xwarkirî. :Dara çemandî. Gopalê çemandî. |
| **Çemayî** | (hn.dar.çewa) Çemandî. |
| **Çember** | (n.x.mê) 1. Nîşan. Sîmbol. 2. şêweyê bazinî. |
| **Çembil** | (n.x.nêr) Çimbil. |
| **Çemik** | (n.dar.mê) şivik. Darik. |
| **Çemîn** | (k.jn.x.mê) Xwarkirin. Bi çemîne, bi çemînin. |
| **Çemyan** | (k.jn.x.mê) Çemîn. |
| **Çemyayî** | (kn.dar.çewa) Çemayî. |
| **Çend** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo pisyara çenînîyê di hêt bi kar anîn. Jîyê te çende?. Ev tişte bi çendê ye? ***Pend*** :Çend fayde min ji cuxînê dîtîye, |

| | |
|---|---|
| | heta, ji kayê?. ***Pend*** :Çend mêrçak bî, ji te mêrçaktir hene. ***Pend*** :Çend tengavî hene, hinde berfirehî jî hene.***Pend*** :çend dûr bî, şirîntirî. |
| **Çene** | (n.x.mê) ***endam*** Erzink. |
| **Çenebaz** | (pn.dar.çewa) Mirovê pirbêj û kêfxweş. Tiraneker. Henekbaz. |
| **Çenebazî** | (n.dar.mê) Henek. Gelte. Tirane. |
| **Çeng** | (n.x.nêr) Zendûbas. Destûmil. Per. ***Pend*** :Mirov teyrê bê çenge.Pend :Mîna çûçika çeng lê birî. Ang ; kesê ji hmû tiştan hatî bêbehirkirin. |
| **Çengal** | (n.dar.mê) Core kevçikeke, du, sê yar çar tilîye jibo girtina xwarinêd req û nîreq bi kar di hêt. :Zad bi çengalê di xwar. |
| **Çente** | (n.x.nêr) Çante. |
| **Çentebask** | (n.l.nêr) Çentê milî. :Çentebask bi milî xwe ve kir û çû !. |
| **Çentedest** | (n.l.nêr) Çentê destî. |
| **Çentik** | (n.dar.nêr) Çentê biçûk. |
| **Çep** | (hn.x.çewa) 1. Kesê bi destê çep kar di ke.2. Xwar. Xwarûvîç.. Kheç. |
| **Çepdan** | (k.jn.l.mê) Dema mirov senta xwe bi gihore û bo alîyê çep yan rast vegere. :Jiber ko min ne di xwest xelik min bi bîne, li rasta gundî min çep da. (K) bn: Dan. |
| **Çepel** | (hn,hk.x.çewa) Mirovê kiryar û gotinên kirêt di kit. Mirovê,gemar. Pîs. Herimî. Lewçe.:Dujminê çepel. |
| **Çepelî** | (n.dar.mê) Kiryara çepel.Gemarî. |
| **Çeper** | (n.x.nêr)1. Amêreke şiv û dar di berêk ra birinê, weke dergehek bo kotan û govên kewal û dewaran, yan perjanan, bi kar di hînin.2.Dîwarek yan şorhek nijinîye jibo xwe li pişt parastinê dema pevdaçûnanda. 3. Navê mêrane. |
| **Çeperkirin** | (n.x.nêr) Perjankirin. Tankirin. :Gov çeper kir. (K) bn: Kirin. |
| **Çepê** | (n,gazkir.dar.mê) Naznav û navê bangkirina keça, jina çep. |
| **Çepik** | (n.x.pir) Dema mirov bi kar û gotinan hemberê xwe şad bi be, çepikan jêra dixwaze.Destqutan. Çeple. |
| **Çepiklêdan** | (k.jn.l.mê) Dema mirov çepikan lê di de. (K) bn: Lêdan. |
| **Çepiklêxistin** | (k.jn.l.mê) Çepiklêdan. (K) bn: Lêxistin. |
| **Çepî** | (hn.x.çewa) Çep. |
| **Çepîn** | (hk.dar.çewa) Karê bi çepê tê kirin. Karê bi dest, pê, çav û htd ê çepê tê kirin. Mirovê çepîn,ang: mirovê çep. |
| **Çepkirin** | (k.jn.l.mê) Berevajîkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Çeple** | (n.x.mê) Destqutan. Destlêkadan. Çepik. |
| **Çepo** | (n.gazkir.dar.nêr) Naznav û navê bangkirina mêrê çep. |
| **Çeprê** | (pn.l.çewa) Kesê bîr û bawera çep heye. Sosîyalîst. |
| **Çeq** | (n.x.nêr)1. Tayê daran.2. Liq. Pişk. |
| **Çeqel** | (n.x.dz) ***candar*** Giyandarek kûvûye.ji gropa gurg û seyan. Rûvî. |
| **Çeqilk** | (n.dar.nêr) Çeq. |
| **Çeqilandin** | (k.jn.x.mê) Çiklandin. |
| **Çeqilmast** | (n.l.mê) Avemast. Dew. |
| **Çeqîn** | (k.jn.x.mê) Çikilîn. Rawistan. :Sing di erdî ra çeqî. |

| | |
|---|---|
| **Çeqrût** | (kn.dar.çewa) Xazok. |
| **Çer** | (n.x.mê) Çerwan. :şivanî pez bir çerê. |
| **Çerandin** | (k.jn.mê) Kewal dewar berdan ser giy û pelexî li mal yan aqarî,da ko xwarinê bi xwen.: Gavanî dewar çerandin. :şivanî pez çerand. (K) bdn: ez di çrînim em di çerînîn, tu di çrînî hûn di çerînin, ew di çerîne ewan di çerînin.Pr: dêbi +bdn. Bdb: di çerand, di çerandin. Db,dûr: çerandibû, çerandibûn.(F): bi çerîne, bi çrînin. |
| **Çerçirandin** | (k.jn.dar.mê) Jenîn. şilqandin. |
| **Çerd** | (n.x.mê) Peyveke bo jêk cuda kirina pezî, bizinî bi kar di hêt. |
| **Çerdbûn** | (k.jn.l.mê) Cudabûn. Jêkvebûn. |
| **Çerdkirin** | (k.jn.l.mê) Cudakirina kewalan. Cudakirin. Ji hevkirin.: Kar û berx ji hev çerd kirin. (K) bn: Kirin. |
| **Çerîn** | (k.jn.x.mê)Weke giyandr xwarinê di xun. Xwarin; taybete jibo candaran bi kar di hêt. : Kewalêd gundî yên li zevîyê di çerin. :Ev karike na çere, çukî hêjta şîrê makê di xwe. |
| **Çerm** | (n.x.nêr) Pîst. Post. ***Pend*** **:**Çermê gonê xwe bixo, mineta qesabî helnegir.***pend*** :Ji mirîşkê çermê xweşe. |
| **Çermik** | (n.dar.mê) Perçeyên çermî jibo pêlav, cante û kelûpelêl din bi kar di hêt. Kevilk. |
| **Çermiqandin** | (k.jn.mê) Tamdan û rengkirina çeman. |
| **Çermiqîn** | (k.jn.x.mê) Hatine rengkirin. Reng girtin. Reng wergirtin. |
| **Çermîn** | (hn.dar.çewa) Pêlav, cente, cilik û htd yên ji çermî hatîne çêkirin. :Sakoyê çermîn. Pêlava çermîn. |
| **Çermsor** | (nejn.l.dz) Hindokên sor. Pîstsor. |
| **Çerxandin** | (k.jn.x.mê) 1.Lêkzivrandin. 2. Xapandin.Pare jê çerixandin. malê wî jê çerixand. |
| **Çerxîkevjal** | (n.l.nêr) Kêvjale. |
| **Çerxîn** | (k.jn.x.mê) Lêkzivrîn. (K) bdn: ez di çerixim em di çerixîn, tu di çerixî hûn di çerixin, ew di çerixe[....it] ewan di çerixin. Pr: dê[bi] +bdb. Bdb: ez di çerixîm em di çerixîn, tu di çerixî hûn di çerixîn, ew di çerixî ewan di çerixîn.Dbdûr: ez çerixîbûm em çerixîbûyn, tu çerixîbûy hûn çerixîbûn, ew çerixîbû ewan çerixîbûn[bi bûn]. (F): bi çerixe bi çerixin. |
| **Çerxkirin** | (k.jn.l.mê) Xweşkirina devêd das, bivir, sator û htd. Tîjkirin. Seqakirin. :Devê bivirî çerx kir. (K) bn: Kirin. |
| **Çerxlêdan** | (k.jn.l.mê) 1. Çerxkirin. 2. Zivrîn. |
| **Çeşn** | (n.x.nêr) Cor. Reng. |
| **Çeşt** | (n.x.mê) Tam. |
| **Çeştkirin** | (k.jn.l.mê) Tamkirin. :Ez xwarinê çeşt di kim. (K) bn: Kirin. |
| **Çerwan** | (n.dar.mê) Cihê çera(çerandin)a terş û kewalî. kûz. |
| **Çesp** | (n.x.mê) Madek nîseke bo pêkve besitina kaxez û tiştên dî. Stirk. |
| **Çespan** | (hk.x.mê) çeleng. Zîrek .kêrhatî. |
| **Çespandin** | (k.jn.x.mê) Karê çesp kirinê.Pêkvenûsandin. |
| **Çete** | (pîşn.x.dz) Caş. Xwefiroş .Rêgir. |

| | |
|---|---|
| **Çetel** | (n.x.mê) Çengal. |
| **Çeteyî** | (karn.dar.dn) Caşatî. Rêgirî. :Wî di jiyana xu da çeteyî nekirîye!. |
| **Çetîn** | (hn.x.çewa) Tiştê bi zehmet, karê giran û bi zehmet. |
| **Çetînbûn** | (k.jn.l.mê) Bi zehmet bûn. Asêbûn. Alizîn. |
| **Çetînî** | (n.dar.mê) Zehmet. zehmetî. Dujwarî. |
| **Çetînkirin** | (k.jn.l.mê) Bi zehmetêxistin. asêkirin. Alozkirin. |
| **Çevandin** | (k.jn.dar.mê) Çemandin. Tewandin. |
| **Çevîn** | (k.jn.x.mê) Çeman. Tewan. Çemyan. |
| **Çevrî** | (n.x.g) ***gagolk*** Çêl, ga û golik. |
| **Çewa** | (perb) ***rêzman*** Alavê pirsînê ye. Çima.Çawa.: Te çewa zanî ez li vêrê me? Çewayî başî? . Çewa di be bila bi be. |
| **Çewal** | (n.x.nêr) Cihal. Cewal. |
| **Çewender** | (n.x.mê) Silika şekirê. şilindir. |
| **Çewir** | (n.x.mê) Bez. Ron. |
| **Çewsandin** | (k.jn.x.mê) Weke mirov, deshelatek zor û kutekîyê li xelik ê bêguneh bi ke. Pêlêkirin.Binpêkirin. |
| **Çewt** | (hk.x.çewa) şaş. Nedirist. :Gotina te kirî ya çewt bû.:Karê çewt. |
| **Çewtî** | (n.dar.x.mê) şaşî. Hele.: Bibore ew çewtîya min bû. |
| **Çewtîkirin** | (k.jn.l.mê) şaşîkirin. : Waneya evro min gelek çewtîyên rêzmanî kirîne.(K) bn: Kirin. |
| **Çê** | (hk,hn.x.çewa) Baş. Çak. Hêja. :Ew mirovekê çê ye. |
| **Çêbûn** | (k.jn.l.mê) Başbûn. peytbûn. Saxbûn. : Tu çê bûy?; ez baştirim supas. :Ew karê ez li dû di geram çê bû. (K) bn: Bûn. |
| **Çêj** | (n.x.mê) Tam. Çêja swîr, tirş, şirîn, tal..htd. |
| **Çêjandin** | (k.jn.mê) Tamkirin. ez di çêjînim, tu di çêjînî, ewan di çêjînin,... |
| **Çêjdar** | (hn.dar.çewa) Xwarina,zadê xweş û bi tam. |
| **Çêjkirin** | (k.jn.l.mê) Çêjandin. Tamkirin. |
| **Çêjtin** | (k.jn.x.mê) Çêjandin. Tamkirin. |
| **Çêkirin** | (k.jn.l.mê) Diristkirin. Peytkirin. Lêkdan. ***Pend*** :Çêkirin çêkirina xudê ye. ***Pend*** :Çêkirin bi zehmete, xirabkirin bi sanahîye.(K) bn:Kirin. |
| **Çêl** | (n.x.mê) ***candar*** Giyandarek şîrdere ,bi mifaye. Manga. ***Pend*** :Çêl dotin, kezwan kelotin. ***Pend*** :Çêl mir dew birya. ***Pend*** :Çêleka tiro, garanekê tiro diket. |
| **Çêlek** | (n.dar.mê) Çêl. |
| **Çêlê** | (gazn.mê) Naznav û navê bangkirina jina wek çêlan qelew û gemjo. |
| **Çêlik** | (n.dar.mê) Çûçikên mirîşkan. Çûçelk. |
| **Çêlîkirin** | (k.jn.l.mê) Baskirin. Li ser axivtin. (K) bn : Kirin. |
| **Çêlo** | (hd,n.nêr) Naznav û navek gazîkirinê ê mêrê gemjo. |
| **Çêr** | (n.x.mê) Çer. Çerwan. |
| **Çêrgeh** | (n.dar.mê) Çerwan. |
| **Çêştin** | (k.jn.x.mê) Çêjtin. |
| **Çêtir** | (hn.dar.çewa) Gelek çê. Baştir. :Ma ne çêtire heger em bi hevre biçin mala Hevalî?. |

| | |
|---|---|
| **Çêtirbûn** | (k.jn.l.mê) Baştirbûn. Başbûn, lêhatin. |
| **Çi** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pisyarê jibo kar û tiştan.Pisyareke jibo tişê nexuya bikar dihêt. :Tu çi di bêjî ? Ev çiye ?***Pend*** :Çi di çînî, ewî di helînî. ***Pend*** :Çi di kene kwarê, ew di hête xwarê.Pend :Çi roja barane,zivistane. ***Pend*** :Çi roja barî zivistane.***Pend*** :Çi dar nînin ba li belgan nede. |
| **Çiçik** | (n.x.mê) ***hedam*** Endamê şîrî yê giyandaran. Sing.Memik. Guhan, guhandîn. |
| **Çift** | (hn.x.çend) Hijmara cot ; wek du, çar,... deh û htd. |
| **Çifte** | (n.x.mê) Tivenga nêçîrê. Cifte. |
| **Çik** 1 | (hn.x.çewa) Rawestayî. Ava çik, bêhin a çik. |
| **Çik** 2 | (n.x.mê) Gotinên bi bizmar ko mirovan birîndar di ke. ::Jiber çikên cîranan, mala xwe ji gund barkir. |
| **Çikandin** | (k.jn.dar.mê) Çiklandin. |
| **Çikbûn** | (k.jn.l.mê)1.Hişkbûna kanî, çem û cokan ji avê.2. Bêhin westana mirovî :Bêhina min çik bû. |
| **Çikçik** | (n.l.mê) Dengê lêdana demjimêrê. |
| **Çikçikandin** | (k.jn.gl.mê) Dengê çikçikê jê anîn. |
| **Çikdanan** | (k.jn.l.mê) Lomekirin. Birîndarkirina hesta mirovî.(K) bn:Danan. |
| **Çikkirin** | (k.jn.l.mê) Hişkkirin. Rawestandin. Zepkirin. :Wî ji tirsan bêhin a xwe çik kir. (K) bn :Kirin. |
| **Çiklandin** | (k.j.x.mê) Dar yan tiştê serê wî tîj di erdekî ra kirin, ta di cihê xwe da di mîne.:Singek di erdî çikiland. (K) bdn:ez di çiklînim em di çiklînîn, tu diçiklînî hûn diçiklînin, ew diçiklîne[..it] ewan diçiklînin. Pr: dê[bi]+ bdn. Bdb : di çikland, di çiklandin. Db,dûr. çiklandibû,...bûn. (F): bi çiklîne bi çiklînin. |
| **Çiklêt** | (n.x.mê) Şekrokea şirîn û piloxe, gelek cor, reng û tam hene. |
| **Çiklî** | (hk.x.çewa) Dar di erdî ra çikilî.Gilçê çikilî.Mirovê req liser pêyan rwestayî. |
| **Çiklîn** | (k.jn.x.mê) Dema tiştekê sertîj bêxî nav ti+tekî, wek axê. : Ev dare ji mêje di dîwarî ra çiklî ye. |
| **Çil** | (hij.mê) hijmara 40. 20+20=40. |
| **Çile** 1 | (hk.dem.dar.nêr) Çil rojên gelek sar li ziviztanê yan gelek gerim li havînê. :Çilê zivistanê. |
| **Çile** 2 | ( hk.dem) Meha yekê. |
| **Çilik** | ( n.dar.pir) Çil rojin, her ji ya peydabûna zarokî tanî roja çilê, daykê hinde pêgirî hene wek xwe dûrxistin ji karê guhnelîyê û derkeftin. |
| **Çilikdar** | (hn.dar.çewa) Jina di çilikan de. Ew ya çilikdare, di çilikan da ye. |
| **Çilikdarî** | (n.dar.mê) Çil rojên çilikan. |
| **Çilî** | ( n.x.nêr) Ta û belgên daran, nexasim dara berî û mazî, bo xwarina kewalan û çêkirina kepran mifa jê tê wergirtin. |
| **Çilîz** | (hk.x.çewa) 1. Nîsek.2. Rezîl. Gemar. şir. |
| **Çilkandin** | (k.jn.dar.mê) Dilop jê êxistin. Werandin. |

| | |
|---|---|
| **Çilkîn** | (k.jn.x.mê) Kevtin, werana dilopan. Kevtina çipikan. |
| **Çilm** | (n.x.nêr) Kilmîş. |
| **Çilmisîn** | (k.jn.x.mê) Çirmisîn. |
| **Çilmkirin** | (k.jn.l.mê) Kifkirin. Kilmî+kirin. |
| **Çilp** | (n.x.mê) Demgê devî li dema xwarinê. Lemç. |
| **Çilpandin** | (k.jn.dar.mê) Tama devî xweşkirin. |
| **Çilpeçilp** | (n.dar.mê) Çilp. Lemçelemç. |
| **Çilpeçilpkirin** | (k.jngl.mê) Çilpandin. |
| **Çilpîn** | (k.jn.x.mê) Dengê çilpêna devî. |
| **Çilqandin** | (k.jn.x.mê) şilqandin. Bi çilqîne. |
| **Çim** | (n.x.nêr) Binê pêlavê yê ko di kevit bin panîya pêyê mirovî. |
| **Çima** | (perb) ***rêzman*** Alavê pirsînê. Çewa. Çawa.: Tu çima na hêy ahenga me?. :Ezê çima qencîya wî jibîr bikim?. |
| **Çiman** 1 | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pirsînê. Çima. |
| **Çiman** 2 | (k.jn.x.mê) Çeman. Çemyan. |
| **Çimandin** | (k.jn.dar.mê) Çemandin. |
| **Çimbil** | (n.x.mê) Destkên ceran, qazanan , dulkan. Htd. : Çimbilkê mesînî şikest. |
| **Çimçir** | (n.dar.mê) 1. Hêzik[hêsk].Colandik. Dolîdank.2. Mencenîq. |
| **Çimçolk** | (n.dar.mê) Hêzik. Colandik. |
| **Çimento** | (n.x.mê) Çîmento. |
| **Çimkî** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo sedeman bi kar di hêt. Çunkî. |
| **Çinar** | (n.x.mê) ***darûbar1***.Dareka bi xemil û ciwane li ser avan şîn di bit belgêd wê pan û pencpencin. 2. Navê kiçane. |
| **Çindik** | (n.x.mê) Xwe havêtin. Lotik. |
| **Çing** | (n.x.mêr) Dengê zingêna asinî. Ting. :Dengê çinga hefsarê hespî di hat guhê mirovî. |
| **Çingeçing** | (n.dar.mê) Çnigên. :Çingeçinga dolabê. |
| **Çingên** | (n.dar.mê) Zingên. |
| **Çingil** | (n.x.nêr) Zendûbas. Çeng. Hingil. |
| **Çinî** | (n.x.mê) Pirt û parçeyên nanî yên jiber xwarinê di mînin. : Kurê min, here çinîyêd nanî dane ber kewalan. |
| **Çinîn** | (k.jn.x.mê) 1.Jêkirina berê fêqî û mitayî. :Sube dê sêvançinîn. 2. Navê keçane.(K) Bdn : ez di çinim em di çinîn. Tu diçinî hûn di çinin, ew di çine[…it] ewn di çinin. Pr. dê[bi]+ bdn. Bdb : di çinî, di çinîn. Db,dûr : çinîbû,... bûn. (F) :Bi çine, biçinin. |
| **Çinko** | (pêrb) ***rêzman*** Alavekê (sedem) jibo girêdana hevekan. Jiberko . jiber. :Ez nahêm cem te , çinko yê nexweşim. |
| **Çip** | (n.x.mê) Dilopa avê. |
| **Çipçip** | (n.l.mê) 1.Kit kit ketina dilopan. Dilopdilop. 2. Dengê dilopan. |
| **Çipik** | (n.x.mê) Dilopên avê. |
| **Çipkirin** | (k.jn.l.mê) 1. Dema çipik ji erdekî di kevin. dema xanî dilopan dike. 2. Zepkirin. Girtin. |

| | |
|---|---|
| **Çipo** | (gaz.n.dar) Naznav û navê bangkirin yê zelamê lenger. |
| **Çiqas** | (pêrb.l) Alavê pirsîna çendî yê.Çend. Herçend. |
| **Çiqil** | (n.x.nêr) Çeqê daran. Tayê daran. |
| **Çir** | (hn.x.çewa)1. Madeyekê nwîsek, bi tiştî ve di mînit.2. Tiştê ron piştî ava wî kêm di bit.Kizir. |
| **Çira 1** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pirsînê. Çawa. Çima. :Çira te wa kir ?. |
| **Çira 2** | (n.x.mê) Lempe. Ronanahî. Find. 2.Navê keçane. |
| **Çiran** | (n.x.mê) Diran. diryan. : Pate çira. Di çire, di çirin. |
| **Çirandin** | (k.jn..dar.mê) Dirandin. : …..cilikêd xwe çirandin. |
| **Çirav** | (n.dar.mê) Cihên ji egera baranê av lê di pengit. |
| **Çirçire** | (n.dar.mê) ***giyandar*** Candarekê biçûke, bi ziyane, liser mêwên tirî û darên fêqî dijît. Çirçirk. Çirçirok. |
| **Çirçirk** | (n.dar.mê) Çirçire. |
| **Çirçirok** | (n.dar.mê) Çirçire. |
| **Çirên** | (n.dar.mê) Dengê dirîna pero, kaxezan. Dengê çirçirê jê hatin. :Fîstanênê wê rakêşa bo çirên jê hat. |
| **Çirçove** | ( hn.dar.çewa) Rojên pir sir, seqem û befir baran gelek di barin. |
| **Çirik** | (hn.x.çewa) Fîşek yan guleyên ne teqin. |
| **Çirikandin** 1 | (k.jn.dar.mê) Deng û awazên teyr û çûçikan. Çûçik liser darê di çirikîne. |
| **Çirikandin** 2 | (k.jn.dar.mê) Dengê têkhisûna didanan. :…. didanêd xwe bo şerî di çirikandin.(K) bed: ez di çirikînim em di çirikînîn, tu di çirikînî hûn di çirikînin, ew di çirikîne[…it] ewan di çirikînin. Pr: dê bi +bdn. Bdb :di çirikand, di çirikandin. Db,dûr: çirikandibû, .. bûn. (F): bi çirikîne, bi çirikînin. |
| **Çirikîn** | (k.jn.x.mê) Tehisandina didanan liser yek ta deng jê bi hêt, xasme dema nivistinê. |
| **Çirisandin** | (k.jn.dar.mê) Tiştekî bi çirisîne; bi teysîne. |
| **Çirisîn** | (k.jn.x.mê) Teysîn. Birisîn. |
| **Çirî** | (kn.dem.x.mê) Mehên payîzê. |
| **Çirîk** | (hn.x.çewa) Mirovê nemerd. Çavteng. Ew zelamekê pir çirîke, naxwaze nanekê bi de mêvanekê. Brx Nandeh. |
| **Çirîkî** | (n.dar.mê) Nemerdî. |
| **Çirîsk** 1 | (n.x.mê) Pirteka biçûk ya agirîye ji darên sotî yan cigarê di peşit. Gurîyek biçûke ji egera lêkxişandina du tenên zivir peyda di be.2 Çembera hîvî,xewin û xwezîyê. 3. Navê keç û xortane. |
| **Çirîyapaşin** | .(n.l.mê,hk.dem) Meha yazdeye . |
| **Çirîyapêşîn** | (n.l.mê, hk.dem) Meha deh. |
| **Çirkandin** | (k.jn.dar.mê) Dengê çikînê jê anîn. : Tilîyên xwe çirkandin. Teqandin. Qirçandin. |
| **Çirke** | (hk.dem,n.x.mê) 1.Dengek biçûk. Demek kurt. Gavek. 2. şêstêka xolgeha demhijmêrê.1/60. |
| **Çirt** | (n.x.mê) Zibil yan zilqa teyr û tewalan. |

| | |
|---|---|
| **Çirtemîz** | (hn.l.çewa) Pirmîz. Çirmîz. |
| **Çirtemîzî** | (n.l.mê) Derdê pirmîzîyê. |
| **Çirûskandin** | (k.jn.mê) Çirîskandin. |
| **Çirûskîn** | (k.jn.x.mê) Çirîskîn. |
| **Çirxîs** | (n.x.mê) ***xwarin*** Core xadeke ji arikê ceh û rûnê pezî di nav êk da di qelînin, nemaze li roja Xidir Ilyasê. |
| **Çiryan** | (k.jn.x.mê) Diryan. Diran. :Cilikên birîndarî di berda çiyan. |
| **Çiryayî** | (hk.dar.mê) Dirayî. Diryayî, xasme jibo ;cilik yan pateyên dirayî tê bikar anîn. |
| **Çişt** | (hn.x.çewa) Gi+t. Peyt. Zîx.Çeleng. |
| **Çiştbûn** | (k.jn.l.mê) Zîxbûn. Peytbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Çiştî** | (n.dar.mê) Peytî. Zîrekî. |
| **Çit** | (Pêrb.alv.pisyar) Di lîztika çitûkitanê da, ang; çi têda ye?. Çi di destê min da heye, cot yan kit? |
| **Çitandin** | (k.jn.x.mê) Hajotina kewalan. :Çite nêrîyê kever!.ango; here!. BRX Wiştandin. |
| **Çitûkitanê** | (n.l.mê) Lîstoke zarokek, mazî, tebel[mat] û htd, dê êxit di destên xwe da û dê miçînin, şanî hemberê xwe de, û bêje çit?. Hemberê wî dê bêjit cot yan kit, heger mîna wî gotî derkevt, ango wî bir û dê hemû mat yan mazî jibo wî bin lê heger şaş derkevt kanê çend di destan da hene dê hindî wan bide hemberê xwe. |
| **Çivêl** | (hn.x.çewa) Yê herdem yarî û henekan di ke, caran ji tixûban derdikeve. |
| **Çivên** | **(** n.x.mê) Dengê çûçikan. |
| **Çivir** | (hn.x.çewa) Teqin yan hevîr, piştî vestirînê piçek zuha di bit. : Teqna çivir bo avahîyan ya başe. Kizir. |
| **Çivîk** | (n.x.mê) Çûçik. |
| **Çivîn** | (k.jn.x.mê) Xwendina tewalan. Dengê çûçikan. |
| **Çix** | (n.x.mê) Renîya befirê. |
| **Çixt** | (hn.x.çewa) Peyt. Zivt. Zîx. Çîst. |
| **Çiya** | (cugirn.x.nêr) 1. Bindayîyên bi kevir, dar û av. şax.2. Navêmêrane. ***Pend*** :Xwedî çiya di bîne, lewra befirê lê di barîne. ang ; tiştê bihêt rêya mirovî binasêd mirovî bi xwe ne. ***Pend*** :Çiya biçiya na kevin, lê çav her dê bi çavan kevin.ang ; hindî ji hev dûrbin her dê gehin hev.***Pend*** :Ez çiya û tu çiya golik ma bê giya.ang; heger her kes xwe mezin biket, çi kespan neket, ziyanê di gehit hemûyan.***Pned*** :Çiyayêd mezin bê befir nabin, newalêd kûr bê av nabin. |
| **Çiyanişîn** | (devern.l) Xelik ê çiya. Çiyavan. |
| **Çiyaqaf** | (n.l.nêr) ***kevineşop*** Çyayê qafê Çiyayekê evsaneyî ye gelek mezin asê ye di çîvanokanda heye. :Mala kiralî li pişta çiyayê qafê ye, ke na gehitê !. |
| **Çiyavan** | (n.dar.dz) 1. Xelik ê çiya. 2. Pehlewanê bi werîsan hil di bit çiya. 3. Navê mêrane. |

| | |
|---|---|
| **Çiyayî** | (devern.dar) 1. Xelik ê çiyay. 2. Navê mêrane. |
| **Çizandin** | (k.jn.dar.mê) Xîçkirin. Xîç di bin ra kêşan. |
| **Çizên** | (n.x.mê) Dengek hêdî zirave caran ji guhên mirov di hêt. |
| **Çî** | (perb) *rêzman* Alaveke jibo piyarkirinê bi kar di hêt. ***Pend*** :Çî gotina min kir, te xwe di ber ra kir. |
| **Çîç** | (n.x.mê) şana hingivî. Sîs. |
| **Çîçal** | (n.x.mê) Çîçelk. |
| **Çîçek** | (n.x.mê) Gul. Gulçîçek. |
| **Çîçik** | (n.x.mê) ***tewal*** Giyandarek , wala(tewal)e firindeye hêk kere û biçûke. ***Pend*** :Çîçik bixwe çi nîne, heta bezê wê tiştek bit. |
| **Çîçkek** | (hn.çend) Piçek. Hindik. |
| **Çîk** | (n.x.mê) Berek yan darek mezine, di yarîya çîkanê da, di kinnîşan.Çing. |
| **Çîkandin** | (k.jn.dar.mê) Qîjandin. Hewarkirin. |
| **Çîkanê** | (n.dar.mê) Yarîyek [lîztin]e, zarok di bin du bir , yek liber çîkê di mîne û ya din xwe di veşêre, bira liber çîkê dê xwe parve kin, hin dê mînin û hin dê çin li bira hevdijê xwe gerin tanî hindekan ji wan di girin, evca dê ew kevin ber çîkê, lê heger nekarîn bira veşarî peyda bikin û bigirin, yek jiwan dê hêt bi dizîve destê xwe li çîkê bi de dê dubare serkevin herin xwe vêşêrin. |
| **Çîlan** | (n.x.nêr) Hiçik. |
| **Çîlik** | (n.x.nêr) Takên darî. |
| **Çîm** | (n.x.nêr) Giya. Hişînayî.Çîmen. |
| **Çîmen** | (n.x.mê) Cihê şînkatî û ciwan .Mêrg. Bax. |
| **Çîmento** | (n.x.mê) Çimento. |
| **Çîmenzar** | (n.dar.mê) Çîmen. |
| **Çîn** 1 | (hk.cih.cugrn) Welatê çînîyan. Welatê Çînê. |
| **Çîn** 2 | (n.x.nêr) Nexş. Nîgar. |
| **Çîn** 3 | (n.x.mê) Texe. : Çîna karkeran. |
| **Çînî** | (nejadn.n.dar) Xelik yan mitayê ji Çînê. |
| **Çînkirin** | (k.jn.l.mê) Nîgarkirin. |
| **Çînko** | (n.x.mê) Amanên bi rengek likeyî tamdayîn. |
| **Çîr** 1 | (hn.x.çewa) 1.Bizina mûyê wê sipî. 2.Sipî.Mirov nexasme keça por zer û sipî. Kej. |
| **Çîr** 2 | (n.x.mê) Çendbarekirina axivtinê. Çîrok. |
| **Çîrdirêj** | (hk.l.çewa) Mirovê pirbêj. Mirovê gotinekê çendbare dike. :Çîrê bes dirêj ke, te em gêj kiîn!. |
| **Çîrê** | (n.dar.gazkirin.mê) ***naznav***.1.Bizina çîr.2. Keça porzer. Sîs. |
| **Çîrên** | (hn.x.mê) Dengek taybetîye, mîna ; dengê dergehî .çîrêna dergehî. Penceran û htd. |
| **Çîro** | (ngazkirin.dar.nêr) ***naznav*** 1.Nêrîyê çîr. 2. Mêrê porzer.Sîs. |
| **Çîrok** | (n.x.mê) Vegêrana bûyeran bi awayek hûnerî. Serhatî. Rûdan. Serpêhatî. |

| | |
|---|---|
| **Çîrokbêj** | (pîşn.dar.dz) Kesê çîrokan di bêjit. |
| **Çîroknivîs** | (pîşn.dar.dz) Kesê çîrokan di nivîse. |
| **Çîrokvan** | (pîşn.dar.dz) Kesê çîrokan di nivîse. Çîroknivîs. |
| **Çîst** | (hn.x.çewa) Zîx. Peyt. |
| **Çît** | (n.x.nêr) 1. Perokek sipîye. Nifs.2. Xêlî. Poşî. Hîşar. |
| **Çîtare** | (n.x.nêr) Peroyêd çîtî. |
| **Çîv** | (n.x.nêr) Dareke mirov di destê xwe di girit. Destedar. ***Pend***:Çîvê stûre, tixûb dûre, çîvê zirave tixûb ave. |
| **Çîvhavêj** | (hk.dar.çewa) Mirovê çîv di havêje. |
| **Çîvanok** | (n.x.mê) Serhatî û çîrokên evsaneyî û pîrhevîyan. |
| **Çîvçîv** | (n.dar.mê) Dengê çûçikan. Çîwçîw. |
| **Çîvçîvkirin** | (k.jn.gl.mê) Çûçik awazan di xwînin. Çivîn. |
| **Çivîn** | (k.jn.x.mê) Çîvçîvkirin. |
| **Çîye** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pisyarkirinê. : Ev çîye? Te çîye?. Navê teçîye. |
| **Çîzçîz** | (nl.mê) Dengê çîzêna çûçikan. Dengê mişk û curdan. |
| **Çîzên** | (n.x.mê) Dengek taybet û zirav, wek dengê teşkên çûçikan . |
| **Çîzok** | (n.x.mê) Zîlkê ji nû hişînbûyî, yê giyayî û derketina bistîka êkê. |
| **Çok** | (n.x.nêr) ***leş*** Geha navbera baq û ranî. |
| **Çokdanan** | (k.jn.l.mê)Dema mirov liser çokêd xwe di raweste hember dujmin û serê xwe şor di ket. (K) bn:Danan. |
| **Çokdaner** | (karn.dar.dz) Kesê xwe jibo neyaran di tewîne. Xwefirotî. |
| **Çokşikên** | (hk,rd.dar.çewa) Kesê axivtinêd wesa dike ko dilê xelkî pê di şkê. şeqilşikên. |
| **Çol** | (n.x.nêr) Aqar.: Ew bi şev li çolî raza, ji ber ko gund û avayî li nêzîk tunebûn. |
| **Çolanê** | (n.dar.mê) Lîstikeke, çend xîçên wekhev liser cihek rast di kêşin dirêjîya gavekê, zarok liser lingekî berê çole bi pêyekî ji xîçan derbaz di kin, li navbera hinekan bêhina pêyên xwe ve didin. |
| **Çole** | (n.x.nêr) Berekê pan biçûke zaro yarîya çolanê pê di kin. |
| **Çolistan** | (n.dar.mê) Cilê çol û bê avahî. |
| **Çolî** | (n.x.nê) Navê mêrane. |
| **Çom** | (n.x.nêr) Çem. Robar. |
| **Çoman** | (cugirn.cih) Bajêrkek Kurdistana Iraqê ye. |
| **Çune** | (hijmar.n) Tune.Nîne. Neyînî. Sifir.(0). 2-2=0. |
| **Çong** | (n.x.nêr) ***leş*** Çok. |
| **Çop** | (n.x.mê) Lastîkeke pirî baye di nava tayêrên tirombêl û paysiklan daye. |
| **Çor** | (n.x.mê) teyr Por. |
| **Çox** | (n.x.mê) Çoxik |
| **Çoxik** | (n.x.nê) Cilikek stûr û bê hiçik. êlekeke ji hiryê çêkirî ye. |
| **Çunkî** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê eger(sedem)ê ye, Jiber ko. Lewra. Jiber hindê. : Ez ne çûm xandingehê, çunkî[çunko] yê nexweş bûm. |
| **Çurtanok** | (n.dar.nêr) Perçe hestûyeke di keve ser çokê mirovî.Serçok. |

| | |
|---|---|
| **Çûçik** | (n.x.mê) Civîk. Çwîçik. |
| **Çûk** | (n.x.mê) ***balinde*** Sivandok. |
| **Çûkreş** | (n.l.mê) ***balinde*** Hacîreşk. |
| **Çûn** | (k.jn.x.mê) Livîn ji cihekî bb yê dî. ***Pend*** :Çû ser avê av lê hişk bû.Ang; bêşensî. (K) bdn : Ez di çim,em di çîn, tu di çî hûn di çin, , ew di çe[çit] ewam di çîn. Pr : dê [bi] çim, çin, çî. Bdb : ez di çûm, em di çûyn [çûn] tu di çûy, hûn di çûn. Db,dûr : çûbûm,..bûyn, ..bû,..... bûn.(F): Bi çe, (bi çû), bi çin[ here. Herin] . |
| **Çûnava** | (k.jn.l.mê) Binavbûn. Niqobûn. |
| **Çûneve** | (k.jn.dar.mê) Dubare çûn cihekî. Vegeran mal. |
| **Çûnûhatin** | (k.jn.l.mê) Bizivîna du serî.ang ; mirov bi çit cihekî û vegerit. Hatinûçûn. Piyase. |
| **Çûşandin** | (k.jn.x.mê) Rawestandin dewaran. şûşandin. Gotin dewaran çûş |
| **Çwîv** | (n.x.nê) ***dar***. Darekê di destê xwe di girin. |

# D

| | |
|---|---|
| **D** | (de) pîta pêncê ji abeya kurdî. |
| **Da 1** | (n.x.mê) 1.Dayk. Deyk.2. Gazîkirina daykê. |
| **Da 2** | (pêşpirt) Pêşpirteke di keve berî kiryaran, mîna ; dakirin dahînan, daqutan. Daleqandin. |
| **Da 3** | (pêrb) Alavê eyînî,ang ; erê. Bêlê. |
| **Dab** | (n.x.mê) Rewuşt. |
| **Dabarîn** | (k.jn.dar.mê) Barîn. |
| **Dabaş** | (n.x.mê) Danûstandin. Babet. Mijar. |
| **Dabaşkirin** | (k.jn.l.mê) Danûstandinkirin. Hûrnêrîn. Lêgeran. |
| **Dabeşbûn** | (k.jn.l.mê) Parvebûn. Pişkbûn. Pirtbûn. |
| **Dabeşkirin** | (k.jn.l.mê) Parvekirin. Lêkvekirin. : Mamosta defter û qelem liser xwendekaran dabeşkirin. (K) bn : Kirin. |
| **Dabêş** | (n.x.mê) Dabaş |
| **Dabêşkirin** | (k.jn.l.mê) Dabaşkirin. |
| **Dabilandin** | (k.jn.dar.mê) Dahîran. |
| **Dabinartin** | (k.jn.dar.mê) Darûbar çandin. Binaxkirin. |
| **Dabiristin** | (k.jn.dar.mê) Milên xwe dane hev û rêzbûn. Rêzbûn. bi rêzbûn. |
| **Dabînkirin** | (k.jn.dar.mê) Peydakirin. Misogerkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Dabûn** | (k.jn.dar.mê) Niqobûn. binavbûn. |
| **Daçek** | (n.dar.mê) rêzman Pêrbest. |
| **Daçikandin** | (k.jn.dar.mê) Çandina tayên daran. Çiklandin. Çandin. |
| **Dad** | (n.x.mê) 1 Perwer. Rastî. Parastina mafan.2. Alavê peşêmanîyê. |
| **Dadan** | (k.jn.dar.mê) 1. Girtin. Daxistin. : Derî dade. 2. Paldan. Rahavêtin. : Hêskê dade. 3. Li peyçûn. li dû çûn. (K) bn: Dan. |
| **Dadbexş** | (hn.l.çewa) Mirovê rasrew û dilovan. |
| **Dadê** | (ngaz,hd.dar.mê) Gazîkirin û nazandina daykê. |
| **Dadgeh** | (n.dar.mê) Xanîyê, Cihê kar û rûniştina dadvanan. Dadgeha serbazî. |
| **Dadger** | (pîşn.dar.dz) Kesê karê wî qanûn û li dadgehê kar di ke. Dadvan. |
| **Dadgehîkirin** | (k.jn.l.mê) Li dadgehê derbazkirina biyara kesekî çi gunehbar yan bê guneh. |
| **Dadî** | (n.dar.mê) Rastî. Dadperwerî. Wekhevî. |
| **Dadmend** | (n.dar.mê) Rastgo. Dadvan. |
| **Dadperwer** | (n.l.çewa) Dadvan. |
| **Dadperwerî** | (n.l.mê) Dadî. |
| **Dadvan** | (pîşn.dar.dz) Dadperwer. Dadger. |
| **Dadok** | (n.dar.mê) Kesê çavdêrî yan sexbêrîya zarokan di kit. Li ber zarokan di mînit. |
| **Daf** | (n.x.mê) Dav. |
| **Dager** | (n.dar.dz) Nêrevan. Zêrevan. Berpirs. |

| | |
|---|---|
| **Dagerandin** | (k.jn.dar.mê) Zivrandin. Vegerandin. |
| **Dagerîn** | (k.jn.dar.mê) Vegeran. Vegeryan. Zivrîn. |
| **Dageryan** | (k.jn.dar.mê) Dagerîn. |
| **Dagirtin** | (k.jn.dar.mê) Pirkirin. Tijîkirin. : Cewal ji mêwîjan dagirt. Zikê xwe dagirt. |
| **Dagîrker** | (karn.dar.dz) Kes yan desteyek malê û welatê mirovî ji xwere bi gire.: Rijêmêd Turk, Iran û Ereb,dagîrkerên Kurdistanê ne. |
| **Dagîrkirin** | (k.jn.l.mê) Dest biserde girtin. : Kurdistan ji alî çar rijêman ve hatîye dagîr kirin.(K) bn: Kirin. |
| **Dahatin** | (k.jn.dar.mê) Hatin xwar. Nizimbûn. Av ya dahatî. Êvitîna birînê ya dahatî;ang . ya kêm kirî. Hatî xwar.(K) bn: Hatin. |
| **Dahatî** | (n.dar.nêr) Pere û berê keda destê mirovî yan dezgeha mirov lê kar di ket, di gehit heftane, mehane, salane. |
| **Dahatû** | (n.dar.nêr) Dahatî. |
| **Dahênan** | (k.jn.dar.mê) Avirandin. |
| **Dahêner** | (pîşn.dar.dz) Kesê avirandinê di ke. Dahênanan dike. |
| **Dahilandin** | (k.jn.dar.mê) Weke mirov tiştekî jorda bihavêjit. şorkirin.Dahêlan. |
| **Dahiştin** | (k.jn.dar.mê) Bêdeng rawestan. Hûrik hizir liser kirin. Mitbûn. |
| **Dahîran** | (k.jn.dar.mê) Kiryareke xwerin û vexwarina ji devî di çe nav gedeyê mirov û giyandaran. (K) Bdn: ez (di) dahîrim em dahîrîn, tu dahîrî hûn dahîrin, ew dahîre[…it] ewan dahîrin. Yan dia di hîrin. Pr : dê da[bi] hîrim, hîrîn, hîrî, hîrin, hîre[…it], hîrin. .Bdb: di dahîra (dadihîra) di dahîran(dadihîran). Db,dûr: dahîrabû,….bûn. (F): da bi hîre, da bi hîrin. Yan bi dahîre, bi dahîrin. |
| **Dahol** | (n.dar.mê) alavê mûzîkê Dihol. |
| **Daketin-kevtin** | (k.jn.dar.mê) Serjêrbûn. Ber bi xwar kevtin. |
| **Dakêşan** | (k.jn.dar.mê) Dema du giranîyêd wek hev hember yek di terazî yan destan de danin, yek ji ya din girantir be; ango ya giran ya sivik di dakêşe. Bo binî kêşan. (K) bn: Kêşan. |
| **Dakirin** | (k.jn.l.mê) Giyandar kirine jor , hajûtine jor. Pez dakir. Bizin dakir. Radan nav. |
| **Dako** | (pêrbest) rêzman Alavê sedem û encamî. Jiberko. Lewra. Jibona.: Em xwarinê di xwen dako ne mirîn.Ez hatim dako te bibînim. |
| **Dakutan** | (k.jn.dar.mê) 1.Darê di hejîne ta fêqî bi keve erdî. 2.Lihêf, nalîk, pero û htd dadiweşînin jibo toz ji nav derkeve.Werandin. |
| **Dal** | (n.x.mê) Gelî. Newal. Nihal. Dol. |
| **Dalan** | (n.dar.mê) Ciheke navbera dîwaran ber bi avahîyan ve diçe. Rêya hatin yan çûn a jûr. Bersivka awayê wê dirêj û lakêş, bazin,çarkujî û htd. |
| **Dalehî** | (n.dar.mê) Rexne yan gazinde bi awayekê nazik, xasim di nav mal û hevalan da, bêy ko hemberê mirovî sil bi be. Bisteyî. |
| **Dalehîkirin** | (k.jn.l.mê) Gazindekirin. Xwe biste kirin. (K) bn: Kirin. |
| **Daleqandin** | (k.jn.dar.mê) Çikilandidn. : Alaya xwe daleqand. Hilawîstin. Li sêdardan. Mirandin. (K) bn: Leqandin. |
| **Daleqîn** | (k.jn.dar.mê) Sêdardan. Hilawîstin. |

| | |
|---|---|
| **Dalho** | (n.x.nêr) Helamet. Mamikê nav rez û baxan. |
| **Dalistin** | (k.jn.dar.mê) Alîstin. Mêtin. |
| **Dalîkerxur** | (n.dar.mê) balinde Qelereşk. |
| **Damaliştin** | (k.jn.dar.mê) Damalîn. |
| **Damalîn** | (k.jn.dar.mê) Bi carekê rakirin û paqijkirin. |
| **Daman 1** | (k.jn.x.mê) Paşde man. Veman. Posîdebûn. Bêgêwilbûn. |
| **Daman 2** | (n.x.mê) Dehmen. |
| **Damanê** | (n.dar.mê) Yarîya damê[dameyê]. |
| **Damanêkirin** | (k.jn.l.mê) bi Damanê lîstin. |
| **Damar** | (n.x.mê) Demar. |
| **Dame** | (n.x.mê) 1. Sindoqa dameyan.2. Lîstikeke bi daman di hêtkirin. |
| **Damelîztin** | (k.jn.l.mê) Damanê. Damanêkirin. |
| **Damezrandin** | (k.jn.dar.mê) Diristkirina part, deste û navendan. Li sala 1946 ê PDK hatîye damezrandin. Ang ; Avakirin. (K) bdn:ez [da] dimezrînim em dimezrînîn, tu di mezrînî hûn dimezrînin, ew di mezrîne[..it] ewan di mezrînin. (F) da bimezrîne ….nin. |
| **Damilandin** | (k.jn.dar.mê) Daxistin. Girtin. |
| **Damxe** | (n.dar.mê) Mor. |
| **Damxekirin** | (k.jn.l.mê) Morkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Dan 1** | (k.jn.x.mê) Ttiştekî bidey êkî. (K) bdn: ez di dim em di dîn,tu didî hûn di din, ew di de […it] ewan di din. Pr: dê [bi] bdn. Ber,db : di da, di dan. Db,dûr. Dabû, …bûn.(F): bi de , bi din.(biden). |
| **Dan 2** | (n.x.nêr) Tov û dindikên genim, ceh, nîsk û htd. |
| **Dan 3** | (hk.dem) Demroj. Sê danên rojê, mîna ; Danê sipêdê. Danê nîvro. Danê êvarî.Danê salê, mîna bihar havîn bayîz û zivistan. |
| **Dana** | (n.x.dz) 1. Xîçêd li şûna birînan liser leşî di mînin. 2. Navê mêrane. |
| **Danan** | (k.jn.dar.mê) 1.Mirov tiştekî dane cihekî. : Kitêbê dane ser mêzê. Zadî dane. Cilikên xwe danan. Çek dana. Danîn.Liser erdî raxistin. 2. Têwerkirin. Havêtin. : Heger tu ne rawestî ez dê berekî danim te.Danîn.3. Avakirin. :Danana navenda civakî. |
| **Danasîn** | (k.jn.dar.mê) Xwe dan nasîn. Pêşkêşkirin. |
| **Danberçavan** | (k.jn.gl.mê) Xistine ber çavan.şanîdan. Nîşadan. Xuyakirin. Ronkirin. Zelalkirin. |
| **Danberhev** | (k.jn.gl.mê) Hevberkirin. Danan hember hev. Rûbirûkirin. |
| **Dane** | (n.x.mê) Pişk. Mînak. |
| **Danedest** | (jn.k.l.mê) Mirov tiştekî bi de destê yekî. :Kesekî yan girtîyekî bi dî destê alî yan kesekî. Pêşkêşkirin. Radestkirin.:Gunehkarî xwe da dest polîsan. |
| **Daner** | (karn.dar.dz) 1. Kesê kitêb yan nivîsekê di danit.Kesê xwedî berhemek nivîskî.2. Navê mêrane. |
| **Danezan** | (n.l.mê) Danpêdan. Derxistin. Daxuyan. |
| **Danêr** | (pîşn.dar.dz) Dadvan. |
| **Dang** | (n.x.mê, hk.cih) 1. Dehmen. 2. Cihê çerandina kewalî li zivistanê. 3. Bin. Jêr. : Gundê me li danga çiyaye. |

| | |
|---|---|
| **Danhev** | (jn.x.mê) Vecemandin. Pêkvekirin. Pêkguhêrîn. |
| **Danhêrk** | (n.l.mê) Core xwarineke ji genimê hêrayî çê dikin ji savar hûrtire.Danhêrkê kelandinê .Danhêrkê kutilkan. |
| **Danik** | (n.dar.mê) Dindik. Tov. Dan.Tomik. |
| **Danîk** | (n.dar.pir) Genimê kelandî û nerim yê jibo savarî di kelînin û bi germî têt xwarin. |
| **Danîn** | (k.jn.dar.mê) Danan. |
| **Danînberçavan** | (k.jn.gl.mê) Li ber çavan danan. Nîşadan. |
| **Danînberhev** | (k.jn.gl.mê) Hevberkirin. |
| **Danişgeh** | (hk.cih,n.l.mê) Zanîngeh. Zanko. |
| **Danîştin** | (k.jn.dar.mê) Rûniştin. |
| **Dankujtin** | (k.jn.l.mê) Biryara kujtina êkî bi dî û bi destê yekî bi kujî. : Dujminêd dagîrker kurdan bi destêd kurdan di din kujtin. (K) bn: Kujtin. |
| **Danmêr** | (k.jn.l.mê) Daybab yan seyman keça xwe di din mêr. Danşû. |
| **Dannasîn** | (k.jn.l.mê) Mirov xwe yan hevalekî bi de nasîn, ango navnîşanana wî bi dit xuyakirin : Ev hevalê mine, navê wî Hêjaye. |
| **Dannivîsandin** | (k.jn.l.mê) Nameyek yan nivîsek ji alî kesekî yan dezgehekî ve jibo mirovî bi hêt nivîsîn. |
| **Danqut** | (n.l.mê) Xarin Xwarineka nemazeye, ji genimê qutayî û sivî jê kirî dirist diken, di gel nok, goşt û hindek corên giyayî di lênin. |
| **Danpey** | (jn.k.l.mê) Kevtin dû. Li şopa wî/wê çûn. : Me da pey wan.(K) bn: Dan. |
| **Danpêdan** | (k.jn.l.mê) Karek yan biryarek dema ji alîyê kes, navend û welatek dî bi hêt pejirandin yan pesendkirn. Nasîn. |
| **Danrê** | (jn.k.l.mê) Bi rê kevtin. : Demhijmêr pêncî êvarê me da rê, nîvşev em gehiştîn qonaxê. |
| **Dansal** | (n.l.mê) Danêd salê. Werz. Demsal. |
| **Danû** | (n.dar.mê) Danîk. |
| **Danûstandin** | (jn.gl.mê) Miştûmir. Gengeşe. Hevrikî.:Jiyan dan û standine. |
| **Danûstandinkiri n** | (k.jn.gl.mê) Miştûmrkirin. Gengeşekirin. Cirekirin. :Danûstandin di nvabera me û wan da di hên kirin. (K) bn :Kirin. |
| **Dansal** | (n.l.nêr) Danekê salê. Werzek salê. :Vî dansalî me libere em bi çîn zozanan. |
| **Danyar** | (n.dar.dz) Daner. Nivîsevan. |
| **Dapaçîn** | (n.dar.mê) Nîşana jêbirinê. (-). |
| **Dapalandin** | (k.jn.dar.mê) Palavtin. Parzinîn. |
| **Dapalandî** | (hk.dar.çewa) Hatî parzinîn. Parzinî.Dilopandin. |
| **Dapalîn** | (k.jn.dar.mê) Parzinîn. Dilopandin.: şîr dapaland; ango li patekî kir jibo ko ji gilêşî pakij bi bit. |
| **Dapîr** | (n.l.mê) Dayka babê yan dayka daykê. Dayka pîr. Dayka mezin. |
| **Dapîrk** | (n.l.mê) Jina sexbêrîya zarokê nûhatî dikit û navika wî dibirit. |
| **Dapîrûşk** | (n.l.mê) Jina sexbêrîya zarokê nû ji daykbûyî di ke. |
| **Dapoşî** | (hk.dar.çewa) Nixavtî. Sergirtî. :Qazana dapoşî. |

| | |
|---|---|
| **Dapoşîn** | (k.jndar.mê) Nixavtin. (K) bdn: ez da di poşim em da dipoşîn, tu da di poşî hûn da di poşin, ew da di poşe ewan da di poşin. Pr : dê da bi+ bdn. Bdb: da di poşî, da di poşîn. Db,dûr: Dapoşîbû, … bûn.(F): da bi poşe da bi poşin. |
| **Daqulandin** | (k.jn.dar.mê) Dabilandin. Dahîran. : Parîyê nan daquland.(K) bdn : ez (di) daqulînim em daqulînîn, tu daqulînîhûn daqulînin, ew daqulîne[..it] ewan daqulînin, yan da(di) qulînin. Pr : dê bi + bdn. Bdb : di daquland, di daqulandin. Db,dûr : daqulandibû,..bûn.(F) : da bi qulîne, yan bi daqulîne, da bi qulînin, yan bi daqulînin. |
| **Daqurçandin** | (k.jn.dar.mê) Daqulandin. |
| **Daqurtandin** | (k.jn.dar.mê) Daqulandin. |
| **Dar** | (n.x.dz) 1 Riwekek mezine, hişîn di bit bi rih, qurm, ta, çeq û bi ta û belgan hatîye xemlandin. : Dara berî, mazî, sêv û htd. 2Cwîv. Destedar. Darê hişik. Pend :Kirim ê darê ne ji darê be, nemana wê nîne. Pend :Dar di bin xwe ra birîn.ang ; karek ji xwe mezintir û bive bi hêt kirin.Pend :Dara xozîyan ya xirşe. Pend :Dara sîberê li xo ne ke.ang ; mirovê bêzax. |
| **Dara** | (n.x.nêr) Navê mêrane. |
| **Darayî** | (n.dar.mê) Diravî. |
| **Darbe** | (n.x.mê) Bizaveka leşkerî dijî deshelatekê û wergiritina wê bi rêya çekî yan pesta xelkî. Gurz.Kodeta. |
| **Darbekirin** | (k.jn.l.mê) Gurz lêdan. Jinav birin. (K) bn : Kirin. |
| **Darbend** | (n.dar.nêr) Banê bi daran hatî bendkirin, Ranan. Ban. |
| **Darbendkirin** | (k.jn.gl.mê) Girtina banî bi daran. Nixavtina banî. (K) bn: Kirin. |
| **Darberî** | (n.l.mê) Dareke li çiyayên Kurdistanê ya mîşeye û çembera neteweyîya kurdane.Dara berî. |
| **Darbest** | (n.l.mê) Texteke ji daran hatîye çêkirin, berikek yan patekî di raxin, birîndar yan mirîyan liser di danin mirov ra di kin. Darterm. |
| **Darbir** | (karn.dar.dz) Kesê daran di bire. |
| **Darbirîn** | (k.jn.l.mê) Dema mirov daran di bire. Darperçekirin. (K) bn: Birîn. |
| **Darcigark** | (n.l.nêr) Darkek kunkirî(simtî), serekê wî cigarê diêxinê û yê dî di kene di devê xweda dwîkêla cigarê têra hi dikêşin. Basik. :Darcigarkê bapîrî ji darê kinêre. |
| **Darçîn** | (n.l.mê) Giyeke tamxweşe di kin nav xwarin û vexwarinan. |
| **Dardarok** | (n.l.mê) Darîqoz. Hophopk. |
| **Dardekirin** | (k.jn.l.mê) Li sêdarê dan. (K) bn: Kirin. |
| **Dardînk** | (n.dar.mê) Darekê dutaye, serê wî yê stûr di erdî ra kirîye û du serên din serevrazin,alîka terşî mîna çilî, rwîsî, giya û htd dixin nav jibo candar bi sanahî bi gehinê û bi xun, herwesa da nekeve erdî û pîs ne bi be. |
| **Darevan** | (karn.dar.dz) Darvan. |
| **Darfiroş** | (pîşn.l.dz) Kesê daran di firoşit. |
| **Darfiroşî** | (karn.l.mê) Karê firotina daran. |
| **Darfiroştin** | (k.jn.l.mê) Firotina daran. Darfirotin. : Çendîn salan karê wî darfirotin bû. |
| **Daring** | (n.dar.mê) Made. |
| **Daringî** | (hn.dar.çewa) Tiştê madeyî.Keresteyî. |

| | |
|---|---|
| **Daristan** | (nl.mê) 1 Welatê daran. Cîyê pir dar. 2. Navê jinane. |
| **Darînk** | (n.dar.mê) Amanên darî. Qazana darî. |
| **Darînqûz** | (n.l.mê) Darek dirêje li ser khela darek din yan cihek bilind dana ye, du kes yan pitir li ser herêk ji serên wî di rûnin hevdu nizim û bilind di kin. Qirnaqûz. Hophopk. |
| **Darkarî** | (karn.mê) Karê birîn , kirîn û firotina daran. |
| **Darkirok** | (n.dar.nêr) Darkoke. |
| **Darkoke** | (n.dar.dz) Giyandarek firindeye xwarina wî bahîv û fisteqin , dara kun di ke jibo hêlîlan yan veşarina xwarina xwe bû dem pêdvî. Pend :Tûba darkokey .kesê hercar biryar bide ko karekî bihêlit, lê roja din dîsan dubare bi kit. |
| **Darkunker** | (n.l.mê) Amêreke bi destî yan têhna karebê kar di ke, jibo kunkirina dar, dîwar û htd bi kar di hêt. Mikare. |
| **Darkutik** | (n.l.nêr) Darkoke. |
| **Darlastîk** | (n.l.mê) çekê kujtina balindeyan ; ji darekê duçeq û du lastîk pêve girêdayîne û serên dî bi kevilkekî ve girêdayîne. Berikan di kin di nava kevilkî da ra dikêşin di balinde û çûçikan wer di kin. Qosk. |
| **Darmazî** | (n.l.mê) Dara mazî, li çîyayên Kurdistanê heşîn di bit |
| | gelek ciwan û bi xemle. |
| **Darqesp** | (n.l.mê) Dara qespê. |
| **Darqosk** | (n.l.mê) Darekê duta(çeq) sipî û hulî kirîye, her rexekî lastîkekê di êxinê û her du serên dî yên lastîka bi alîyên kunkirî yên kevlekî di bin û girê didin. Qoskek jê dirist di bit. |
| **Dartaş** | (pîşn.l.dz) Kesê karê dartiraşînê di ket. Pîşesazîya daran diket. Wek diriskirina kentûr, qumsor, text û htd. |
| **Dartaşî** | (karn.l.mê) Karê çêkirin û lêkdana kelûpelên navmalîyên ji darî di hên çêkirin; wek tex, dîwar, depebend û htd. |
| **Darterm** | (n.l.mê) Darbest. |
| **Dartevin** | (n.l.nêr) Yarîyeka dilvekere werîsekî bi darekêve di ken û serê din bi du alîyên darek qayîm û hulî ve girê di din, her serek darî mirovek liser radiwestit û werîsî digirit û li nîvê du, sê mirov di rûnin xwe di daweşînin dako dartevin bi hêt û diçit wek colankê û dartevinvan sitranan dibêjin. |
| **Dartevinvan** | (karn.l.dz) Mirovên bi dartevinî di lîzin. |
| **Dartiraş** | (kn.l.dz) Dartaş. |
| **Dartiraşî** | (kn.dar.mê) Dartaşî. |
| **Dartû** | (n.l.mê) Dara tûyê. Tû. |
| **Darvan** | (pîşn.dar.dz) 1 Mirovê daran li çîya û çolan dara di birit bû sotinê û karên malê.2 navê mêrane. Êzingvan. |
| **Darvanî** | (kar.dar.mê) Karê birîn, kirîn û firotna daran. |
| **Darxistin** | (k.jn.dar.mê) 1.Li sêdarê dan. Hilawîstin.2. Rêxistin. |
| **Darxîç** | (n.l.mê) Qamçî. |
| **Darxurme** | (n.l.mê) Dara xurme. Dara qesp. |
| **Das** | (n.x.mê) Amêreke hesinî, dev tîje destikek heye, jibo birîn û hildana daran bi kar di |

| | |
|---|---|
| **Dasî** | (n.x.mê) Stirîyên havînê di nav pelexî da bi cil û delingên merivî ve di mînin. |
| **Dastan** | (n.x.mê) Dîrok û serpêhatîyên qehremanî û mêrxasîyê û herdem li ser ezmanê xekîne . |
| **Daşandin** | (k.jn.dar.mê) Daweşandin. |
| **Daşir** | (n.dar.mê) Tewalêt. |
| **Dav** | (n.x.mê) 1.Tayê bendikî. Tayê dezî. 2. Tora giritina çûçik ,kew û tewalên dî. 3.Pîlan. |
| **Davdoz** | .(hk.l.çewa) Yê divêt her tiştî agehdar bit . nehecimtî. şareza. : Eve tu li vir çi dikî davdozo?. Eve çi pîremêrekê davdoze !.Matêker. |
| **Davdozî** | (n.l.mê) Mêtêkirin. |
| **Davek** | (n.dar.mê) Qayîş. |
| **Dawer** | (pîşn.dar.dz) Dadwer. Dadvan. |
| **Dawerandin** | (k.jn.dar.mê) Daqutan. Werandin. (K) bn: Werandin. |
| **Dawerîn** | (k.jn.dar.mê) Weryan. Kevtin. |
| **Daweşandin** | (k.jn.dar.mê) danan)lêdana) gurzek bi hêz ko weşên jê bi hêt.(K): ez dadi weşînim em dadi weşînin, tu dadiweşînî hûn dadiweşînin, ew dadiweşîne ewan dadiweşînin. (F): da bi weşîne da biweşînin, yan bi daweşîne, bi daweşînin. |
| **Daweşîn** | (k.jn.dar.mê) şilqan. Hijyan. |
| **Dawet** | (n.x.mê) Dewat. şahî. Govend. |
| **Dawetkirin** | (k.jn.l.mê) şahîkirin. Leyzîn. (K) bn: Kirin. |
| **Dawên** | (n.x.mê) Dehmen. Dang. Lêv. |
| **Dawênpak** | (hn.l.çewa) Dehmenpak. Hêja. Xwedî rûmet. |
| **Dawênpîs** | (hn.l.çewa) Dehmenpîs. Bênamûs. Bêhetik. |
| **Dawiyandin** | (k.jn.dar.mê) Bi dawî anîn. Bi dûmahîk înan. Kutakirin.(K) bdn : ez di dawînim em di dawînîn, tu di dawînî, hûn di dawînin. Pr : dê bi +bdn. Bdb : di dawîyand, di dawîyandin. Db,dûr : dawîyandibû,..bûn. (F) : bi dawîne, bi dawînin. |
| **Dawî** | (n.x.mê) Dûmahî. Brx Berahî. |
| **Dawîhatin** | (k.jn.l.mê) Dawiyandin. Bi Dûmahîhatin. Kutabûn. (K) bn : Hatin. |
| **Dawîn** | (hn.dar. çend) Ya dûmahîyê. Ya dawîyê. :Cara dawîn. Meha dawîn. |
| **Dawudkêdunikil** | (n.gl.nêr) Core teyreke kumrek mîna nikil liser serê wî ye, mîna du nikilan xuya di ke. Teyrê Silêman pêxember. |
| **Dax 1** | (n.x.mê ) 1. şûna (cihê) sotinê li ser leşî. 2. Kovan. |
| **Dax 2** | (hk.dem) Kevin; Roj. Brx şev. |
| **Daxaz** | (n.dar.mê) 1.Her tiştekê dilê mirovî bi vêt. Dest bû dirêj kirin. Viyan. Hîvî. : Daxaza min ewe ko tu yê çak û jî dirêj bî.2. Navê xort û keçane. |
| **Daxazî** | (n.dar.mê) Daxaz. |
| **Daxazkirin** | (k.jmê) Tiştê mirov daxaz bi ke.Tiştê mirovî di vêt. : Ez dê daxazekê ji te bi kem, ne bêje ne !. (K) bn :Kirin. |
| **Daxistin** | (k.jn.dar.mê) Girtin. (K) Bdn: ez da dixim, en dadixîn, tu dadixî, hûn dadixin, ew dadixe, ewan dadixin.yan di (daxin). PR: dê bi daxim, daxîn, |

| | |
|---|---|
| | daxèxî, daxin, daxe, daxin. Bdb : Dadixist. Dadixistin, yan di daxist, di daxistin. Db,dûr: Daxistibû,..bûn. . (F) : daxe[dabixe] daxin[dabixin]. Yan bi daxe, bi daxin. |
| **Daxkirin** | (k.jn.l.mê) Bi Hesin, pel yan bizotî cihekê leşî bi şewitînin dako bi hêt nîşakirin. Guhêd kewalan dax di ken dako bi hên nasîn. Birîn dax kir. (K) bn : Kirin. |
| **Daxme** | (n.dar.mê) Mor. |
| **Daxmekirin** | (k.jn.l.mê) Morkirin. |
| **Daxuşandin** | (k.jn.dar.mê) Li erdî xişandin. Rakêşan.Xişkirin. Revandin. |
| **Daxuyanî** | (n.l.mê) Tiştê di hêt xuyakirin bi nivêsîn. Ragehandin. Ronkirin. |
| **Daxwaz** | (n.dar.mê) Daxaz. |
| **Daxwazkirin** | (k.jn.gl.mê) Daxazkirin. |
| **Daybab** | (n.l.pir) Dayîk û bab. Semyanên zaroyan. |
| **Dayê** | (n.gazkir.mê) Dayîk. |
| **Dayîk** | (n.x.mê) Xwedîya yek yan pitir zaroyan ko ji wê peyda bûne. . Da. Dadê. |
| **Dayîn 1** | (n.dar.mê) Jina li şûna deykê sexbêrîya zarokî di ke. |
| **Dayîn 2** | (k.jn.x.mê) Dan.: Pere dayîn. Xwarin dayîn. |
| **Daykemar** | (n.l.mê) Bizinmişk. Bîkmarê mezin. |
| **Dazanîn** | (k.jn.dar.mê) Diyarkirin. Xuyakirin. (K) bn: Zanîn. |
| **De** | (hk.dem) Dê. |
| **Debance** | (n.x.mê) Çekekê biçûke fîşek û guleyên nemaze di xwe. bo şer û berevanîyê bi kar di hêt. Demance. Werwere. |
| **Debar** | (n.x.mê) Kar û koka jiyanê. Rêvebirin.Berhevî. |
| **Debarkirin** | (k.jn.l.mê) Karê xwe kirin. Îdarekirin. . : Ez di karim evsal debara xwe bi kim, bêy pêdvî kesê bi bim. (K) bn: Kirin. |
| **Debe** | (n.x.mê) Setil. |
| **Debeng 1** | (hn.x.çewa) Kêfxweş. Devkenî.Beşoş. |
| **Debeng 2** | (hn.x.çewa) Bêmejî. Sawîlke. |
| **Decal** | (n.x.nê) Di çîrokên dînî da hatîye ko gîyaneyek xirab li roja dawîya dunyayê dê xuya bit, dema xwarin nemînit, ewî hemû corên xwrinê hene mirov gelek birsî(birçî)ye , lê yê nikarit xwe ragirit li dwîv biçit dê xwe ji xudê ket û kafir bit.. |
| **Def 1** | (n.x.mê) mûzîk Amêrek mûzîkêye bazineyî, alekê wê bi kevilê gîyandaran dapoşîye û lêvên alê din bi xelekên hesinî rêz kirîne û bi destî lê di xin . |
| **Def 2** | (hk.cih) 2. Nik. Rex. Tenişt. Ba.Cem.: Were def min xorto. Li def me befir ya barî. |
| **Defandin** | (k.jn.dar.mê) Li defê xistin. |
| **Defîne** | (n.x.mê) Xizîne. |
| **Degme** | (hk.dem) Caran. Carna. Hinde caran. Kêm caran. |
| **Degmen** | (hn.x.çewa) Zehmet. Kêm. |
| **Deh** | (hijn.çend) Hijmara 10 . 5+5= 10. Pend :Li deh avan derbaz bû , gozeka wî ter ne bû. |

| | |
|---|---|
| **Dehan** | (hijn.çen.dar) Bi dehan. Dehcarkî. : Li pevçûnekê de bi dehan kes hatin kujtin. |
| **Dehbe** | (n.x.nê) 1. dirinde Giyandarên(ginawir) dirinde yên goştxwer, terş û kewalan di xun. Wek gurg, heftiyar. 2.Mirovê kirêt û dirinde. |
| **Dehcarkî** | (hijn.çend dar) Rûdanên bi dehan car dubare di bin. |
| **Dehem** | (hijn.çend) Ya/ yê dehê. |
| **Dehik** | (hk,çen.mê) 1. Êk ji deh. 1/10. 2. Deh rojên bi xêr ko xelkê dindar niza û rojîyan di ken û di girin. |
| **Dehil** | (n.x.nêr) Cihek tijî(pir) qerem, stirî, çeq û tiraş. Pend :Heger agir berbû dehlî, ter û hişk pêkve di şewitin(sojin). Ang ; heger kiryareka çewt rû bi ziyan di gehe de çak û xirab wek hev. |
| **Dehmen** | (n.x.mê) lêvên kiras û kurtekan. |
| **Dehmenpak** | (rd.l.çewa) Mirovê hêja û ji xwe şerimkirî. |
| **Dehmenpîs** | (rd.l.çewa) Kesê ezmanreş, bê rêz û rûmet. |
| **Dehol** | (n.dar.mê) Dihol. |
| **Deholjen** | (karn.l.dn) Diholjen. |
| **Dehollêdan** | (k.jn.gl.mê) Dihollêdan. (K) bn : Lêdan. |
| **Dehollêxistin** | (k.jn.gl.mê) Dihollêdan. (K) bn: Lêxistin. |
| **Deholvan** | (karn.dar.dz) Diholvan. |
| **Delak** | (karn. x.dz) 1. Kesê li serşûxanan xizmeta xelkî di ke. 2. Sertiraş. |
| **Delakxane** | (n.dar.mê) Sertiraşxane. |
| **Delal** | (hn.x.çewa) 1.Xweşik. Rind. Ciwan. 2. Navê keçane.3. Navbij. |
| **Delalbûn** | (k.jn.l.mê) Xweşikbûn. Ciwanbûn. |
| **Delalî** | (kn.dar.mê) Keseke li meydankên kewal û dewaran navbijîya kirîn û firotinê dike navbera xwedî û bikiran. |
| **Delalkirin** | (k.jn.l.mê) Ciwan. Rinkirin. (K) bn :Kirin. |
| **Delav** | (n.dar.nêr) 1.Amanê vexwarina avê. Dolik.2. Kendav. Girav. 3. Covan. Kerax.4. Pêl. |
| **Delik** | (n.dar.mê) Perçe pateyekê nîsek û bijîne û dermankirî ye, diêxin ser birîn û cihên kul. |
| **Delikandin** | (k.jn.dar.mê) Delik bi leşî ve kirin. (K) bdn: ez didelikînim em di delikînîn, tu di delikînî hûn di delikînin, ew di delikîne[..it] ewan di delikînin. Pr: dê bi + bdn. Bdb : di delikand, di delikandin. Db,dûr: delikandibû, delikandibûn. (F): bi delikîne, bi delîkînin. |
| **Deling** | (n.dar.nêr) Cihê(şûna) pê di derpê,pentelon, şelwal î da der dikevit. Dawîya di kevit ser pêyan. |
| **Delî** | (n.x.dz) Qereç. Mutirb. |
| **Delîve** | (n.x.mê) 1 Derfet. 2 Der . Cihê derbazbûnê. |
| **Delûv** | (n.x.mê) Setil. |
| **Dem** | (hk.dem,n.x.mê) Kat. Wext. Çax.: Her şev vî demî ez dinivim. : Dema we xweş be. |
| **Dem** | (hk.dem.x.çewa) Xasme jibo çayê bikar dihêt ango.dijwar, bitov. : Çaya hewe ya bi deme, we diyare gelek tovê kirîyê. |

| | |
|---|---|
| **Demaborî** | (n.l.mê) rêzman Dema çûyî. Derbazbûyî. |
| **Deman** | (n.dar.mê) Kirê. |
| **Demance** | (n.x.mê) Debance. |
| **Demar** | (n.x.mê) 1. Rihên leşê mirovî yên hevbendîkirina navbera mejî û leşî. 2. Borîyên xwînê. |
| **Demarniman** | (k.jn.l.mê) Daxazkirina xweşî û nojdarîyê jibo hevdu.Noşîcan. (K) bn : Niman, nimyan. |
| **Dembosk** | (n.l.nêr) Derzîk yan her asinkek sertîj bo peytkirina cilikan û alavên din. |
| **Demdem** | (hkdem,rêzkirin) Carcar. |
| **Demdemî** | (hk.l.çewa) Merivê ko her demekî bi rengekîye, yan boçûnek heye. Li dwî demî xwe di guhorit. Gêwlo. |
| **Demekî** | (hk.dem) Carekê. Heyamekê. Zemanekî. |
| **Demhat** | (hk.dem) 1. Dem. Çax. 2. Navê mêrane. |
| **Demhijmêr** | (n.l.mê) Amêreke jibo hijmartin û diyarkirina demê bi kar di hêt. Gelek corên wan hene, mîna, demhijmêra destî, berîkê, dîwaran û htd. 2.Pişkeke ji şevûrojan.ango 1/24, her demhijmêrek 60 xolgehin û xolgeh di be 60 çirke. |
| **Demgirêdayî** | (hk.l.çewa) Mirovê girêdaye jiber jivanan û dem kême.şepilî.şepirze. |
| **Demildest** | (hk .dem) Karek di dema xweda bi hêt kirin(encamdan).êkser. Lezgîn. : Wan demildest nexweşê xwe gehand xestexanê. |
| **Demî** | (hk.dar.çewa) Katî. Çaxî. Wextî. Brx Herdemî. Hergavî. |
| **Demîn** | (n.dar.mê) 1.Tîtal. Dabûnerît.2. Dema bi serve çûyî, derbazbûyî. |
| **Demjimêr** | (n.l.mê) Demhijmêr. |
| **Demkirin** | (k.jn.l.mê) Tovça kirin nav ava kelandî jibo rengê wê sor bi be. (K) bn : Kirin. |
| **Demokrasî** | (n.peyv.biyan) Sîstemeke ko gel rolê xwe di deshelata wê da pire. |
| **Demokrat** | (hn.peyv.biyan) Kes,deste yan partî yê/ya jibo demokrasîyê xebatê di ke û bawerî bi wê heye. |
| **Demsal** | (hk.dem) Çar demên salê.Werz. Dansal. |
| **Den** | (n.x.mê) Cerek mezine ji axê dirist kirîye(axa cerkan) bo ava tezî a vexwarinê bi kar di hînin.2. Zik. |
| **Dendik** | (n.dar.mê) Dindik. |
| **Dendikî** | (hn.dar.çewa) Navokî. |
| **Dendikreş** | (n.l.nêr) Zebeş. şitî. |
| **Deng** | (n.x.mê) Awaz, xurîn, nizeniz, ya ji devê mirov, giyandar,livîn yan vêk kevtina tenan peyda di bit .: Dengê kewî li çiyan xweş di hêt.Pend :Dengêşeşan, kelexê mêşan. Ang; kesê gotinên ji xwe mezintir di ke. Pend :Dengê diholê ji dûr xweşe.ang; tiş kes, yan cihê mirovî ne dîtî li nik mirovî yê xweş û şirîne. |
| **Dengbêj** | (pîşn.l.dz) Sitranbêj. Lavjebêj. : şivan Perwer dengbêjekê bi navdenge. |
| **Dengbilind** | (hk.l.çewa) Mirovê hêl di axivit. Dengê wî bilind. |
| **Dengbilindî** | (n.l.mê) Dengûdor. : Dengbilindîya zarokan ez ji xew rakirim. |
| **Dengbilindkirin** | (k.jn.gl.mê) Dengbilindî. Dengûdor. |

| | |
|---|---|
| **Dengbirîn** | (k.jn.l.mê) Bêdengbûn. Hişbûn. (K) bn: Birîn. |
| **Dengdan** | (k.jn.l.mê) Li dema hilbijartinan xelik dengan di de berbijarên xwe.: Ez dê dengê xwe bi dim wî kesî yê berjewendî ya gelê me bi parêze. (K) bn: Dan. |
| **Dengdar** | (n.l.mê) Hemû pîtên abeya kurdî ji bilî heşt dengdêran. Nivok. |
| **Dengdêr** | (n.l.mê) Pîtên dengdêr di abeya kurdî da heştin : a,e,ê,i,î,o,u,û. Zingok. |
| **Dengîr** | (hn.dar.çewa) Bi navdeng. Navdar. Navdêr. |
| **Dengjar** | (hn.l.çewa) Mirovê dengê wî dilsoj.Melûl. |
| **Dengketin** | (k.jn.l.mê) Dengkevtin. |
| **Dengkevtin** | (k.jn.l.mê) Ji egera nexweşî yan qîjandinê dengê mirov kiz di bit û bi ser nakevit. : Hindî duhî min kirîye hewar dengê min yê keftî. (K) bn: Kevtin. |
| **Dengkirin** | (k.jn.l.mê) Bangkirin. Gazîkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Denglêkirin** | (k.jn.gl.mê) Lê xurîn. Lê heytandin. Gazinde jê kirin. : Dengê xwe li zarokan neke, dako ji te ne tirsin. (K) bn: Kirin. |
| **Dengşirîn** | (hn.l.çewa) Yê dengê wî jibo gotina sitran, helbest û çîrokan pir şirîn.Dengxweş. |
| **Dengûdor** | (n.l.mê) Qerebalix.: Eve çi dengûdore ji mala cîranan di hêt. |
| **Dengûdorkirin** | (k.jnlmê) Qerebalixkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Dengvedan** | (k.jn.l.mê) 1. Dema dengek der di kevit, dubare berevajî di bit û di hêt bihîstin, xasme li gelî û newalan. 2. Bi navdeng kevtin. Pend :Mîna kevirî deng ve di de. Ang; mirovê gotinên hevberê xwe di vecût dubare di ke. (K) bn : Vedan. |
| **Dengxweş** | (rd.l.çewa) Yê dengê wîjibo stirîn û xwendinê xweş be. |
| **Dengzar** | (n.l.mê) Dengûdor. |
| **Denik** | (n.dar.mê) Dindik. |
| **Denîmark** | (cugr.n,hk.cih) Welatekê Ewropaye. |
| **Denîmarkî** | (nej,n.dar) Mita yan mirovê ji Denîmar. |
| **Dep** | (n.x.nêr) 1. Darek pan û tiraşî ye bo text, dergeh û pêdvîyên dî mifa jê werdigirin. 2. Pan. depê singê wî. |
| **Depreş** | (n.l.nêr) Depeke bi dîwaran ve kirî ye,li xwendingehan û cihêd dî waneyan liser di nivîsin.Textereş. |
| **Deq** | (n.x.dz) 1. Parçe nivîs. Nivîsar. : Mamosta deqa nivîsê ji mere xwand. 2. Xalên reş yan şîn ko mirov liser dest û giyanê xwe wêne di ke. 3. Mat,mazîyeke ko zaro pê di lîzin li yên hev dixin. 4.Wire.Gêwil. Keyf. |
| **Deqandin** | (k.jn.dar.mê) Deq liser leşî çêkirin. |
| **Deqdan** | (k.jn.l.mê) Deqandin. (K) bn: Dan. |
| **Deqkirin** | (k.jn.l.mê) Deqdan. (K) bn: Kirin. |
| **Deqşikandin** | (k.jn.l.mê) Lêheytandin. Paşvebirin. Gêwilşikandin. : Mamostayî evro pîs deqê min şikand çunkî min waneyên xwe berhev ne kiribûn. (K) bn: şikandin. |
| **Der** | (n.x.mê) 1.Dergeh . Çeper. 2. Rê. 3. Dervank. Qepax. 4. Cih : Tu ji kûderê di hêy ? 5. rêz,..Pêş û paşpite. : Hatinder. Kirinder. Derkirin. Derxistin. Derbazkirin. Derhavêtin. |
| **Derabzûn** | (n.dar.mê) Derazînk. |

| | |
|---|---|
| **Deramet** | (n.x.nêr) Mita. Ber. Dahatî. |
| **Deranîn** | (k.jn.dar.mê) !. Anîn der. Inan der .derêxistin. : Nojadarî zilikek ji çavê nexweşî deranî. 2. Aşkerakirin. Xuyakirin. |
| **Derav** | (n.x.nêr) 1. Cihê ava wî ya tenik ko mirov û candar lê derbaz di bin.2. Çoya avê. : Kanîya gundê me deravekê avê jiber di çit.3.Kawdan. Rewş.: Niha hûn di çi derav de dijîn?. |
| **Deravok** | (k.dar.nêr) 1. Deravê biçûk. Deravk. 2. Cihê derbazbûnê. |
| **Derazînk** | (n.dar.mê) Dîwarkekê biçûke di derê malanda, di kevit alîyê bin dergehî, dergeh xwe li ber di girit û rêya hatina ba û sermayê di girit. |
| **Derbaz** | (hn.dar.çewa) rêzman Dema çûyî. Biserveçûn. |
| **Derbazbûn** | (k.jn.l.mê) Li cihekî,çiyayek, avekê bi dey û biçî alîyê din. Têperîn. (K) ez derbaz di bim em dderbaz di bin, tu derbaz di bî hûn derbaz di bin, ew derbaz di bit ewan derbaz dibin. (F) derbaz be , derbaz bin, yan derbaz bi be, derbaz bi bin. |
| **Derbazkirin** | (k.jn.l.mê) Meriv barekî, mirovekî yan tiştekî li ciyekî bi borîne. : şivanî pez êkêk li çemî derbaz kirin. :Mêr ew mêre yê xwe jê (tengavî) derbaz bi ke. (K) bn :Kirin. |
| **Derbend** | (n.dar.mê) Cih, gelîyê derê wî hatî dîwarkirin jibo xirvekirina avê yan derbazbûnê. Sikir. Pengav. |
| **Derbendkirin** | (k.jn.gl.mê) Dîwarkirin yan nijinîna derê gelî, newal yan qodîkan. Girtin û tundkirina derê amanan. (K) bn: Kirin. |
| **Derbest** | (hn.dar.çewa) Tiştê derê wî hatîye girtin, bestin. Dergirtî. Nixavtî. |
| **Derbestkirin** | (k.jn.gl.mê) Dema derê amanekî bi hêt girtin. |
| **Derbider** | (hn.l.çewa) Kesê ko ji welat , mal û warê xwe dûr dikeve.Aware. Mişext. |
| **Derbiderbûn** | (k.jn.gl.mê) Ji mal û warê xwe dûr kevtin.: Ji egera nexweşî û kawdanên aloz gelek ji xor û keçên kurd derbider bûn. (K) bn:Bûn. |
| **Derbiderî** | (n.l.mê) Awareyî. |
| **Derbiderkirin** | (k.jn.gl.mê) Bi xurtî ji mal warî derêxistina xelkî. (K) bn:Kirin. |
| **Derçûn** | (k.jn.dar.mê) 1.Derkevtin. Derketin. : Eve du roje babê min ji mal der çûye.2. Serkevtin. : Xwendekarên gundê me îsal hemû derçûn. (K) bn: Çûn. |
| **Derd** | (n.x.nêr) 1. Êş. Jan. Nexweşî. Kovan. Brx Derman. |
| **Derdan** | (k.jn.dar.mê) 1. Weke çipikên avê ji cihekî der di kevin. Dêrandin.2. Pivdank. |
| **Derdandka mîzê** | (n.l.mê) Pivdanka mîzê. Mîzdan. |
| **Derdekopan** | (n.l.mê) noj Nexweşîyeka janêd dujwar di kevin masolkên mirovî. Têtanûs. |
| **Derdekurtan** | (n.l.mê) noj Derdekopan. |
| **Derdese** | (n.l.mê) noj Nexweşîyeke ji egera geztin[leq]a segên nesax û har mirovan di gire. |
| **Derdest** | (rd.dar.çewa) Desteser. |
| **Derdestkirin** | (k.jn.gl.mê) Desteserkirin. |
| **Derdmend** | (hn.dar.çewa) Nexweş. Nesax. |
| **Derebeg** | (karn.l.dz) Keseke ji texeka bilind û zengîne, erd û male hejaran û keda wan di xot. Axa. |

| | |
|---|---|
| **Derebegatî** | (n.dar.mê) Axatî. Kedxwarî. |
| **Derebegî** | (hk.dar.mê) Derebegatî. |
| **Dereng** | (hk.dem) Direng. |
| **Derengî** | (hk.dem) Direngî. |
| **Derengkevtin** | (k.jn.l.mê) Gîrobûn. |
| **Derengtir** | (hk.dem) Pitir dereng. Hêjta direng. Pitir veman. : Ezê piçekê ji te derengtir vegerim malê çunkî karekê min heye. |
| **Derengtirîn** | (hk.dem) Ji hemû deman derengtir. |
| **Derew** | (n.x.mê) Direw. Vir. |
| **Derewbêj** | (hk.l.çewa) Mirovê derewan dike. Merivê viran di bêje. |
| **Derewbûn** | (k.jn.l.mê) Dema gotinek di be derew. : Ta derew dibit rast serê xwedî tê diçit.: Ew gotinên dijî hewe hatîn kirin, hemû bûn derew. |
| **Derewçîn** | (hk.l.çewa) Direwîn. Derewbêj. Direwker. |
| **Derewîn** | (hk.dar.çewa) Derewçîn. Bafiro. |
| **Derewker** | (hk.dar.çewa) Derewîn. |
| **Derewkirin** | (k.jn.l.mê) Virkirin. Direwkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Derewzîn** | (hk.dar.çewa) Xapînok. |
| **Derêxistin** | (k.jn.dar.mê) 1. Derkirin. Jê havêtin. : Babê kurê xwe ji mal derêxist. 2. Aşkerakirin. Xuyakirin. |
| **Derfet** | (h.x.mê) Delîve. Hel. Hilkeftin. şens. Kewdanên eyînî. |
| **Dergeh** | (nl.n) 1 Der. : Dergehê mala xwe li mêvanan vekir. 2 Hîvî.: Xwedê dergehekî jibo me veke.3. Rê. |
| **Dergehvan** | (n.dar.dz) Kesê ku liber dergahê baregeh, yan malan di rawestit û nêrevanî û sexbêrî ya xelkî diket. Parêzvan. |
| **Dergehvanî** | (n.dar.mê) Nêrevanî. Parêzvanî. |
| **Dergistî** | (n.dar.dz) Desgirtî. Dezgir.Xastî. |
| **Dergîs** | (n.dar.dz) Desgirtî. |
| **Dergûş** | (n.dar.mê) 1.Landik. Dêdîk. 2. Zarokê sava di landikê de. |
| **Derhatin** | (k.jn.dar.mê) Jê hatin der. Derkevtin.(K) bn: hatin. |
| **Derhênan** | (k.jn.dar.mê) Derhînan. Deranîn. |
| **Deriz** | (n.x.mê) Kelişteka biçûk, tîkeke di keve dîwar, ber, hestû û htd. |
| **Derizandin** | (k.jn.dar.mê) Mirov yan hêzek ji egera lêdan cihek, givaştinê tîkekê bi êxit cihekî.: Dengê topan dîwarên me yên derizandîn. (K) Ber,dn:Ez di derizînim, em di derizînîn, tu di derizînî, hûn di derizînin, ew di derizînin, ewan di derizînin. Pr: dê[bi]+ ber,dn.Berd,db: di derizand, di derizandin. Db,dûr: Derizandibû, …bûn. (F) : bi derizîne, bi derizînin. |
| **Derhînan** | .(k.jn.dar.mê) tişekî bînî der. Derînan. Der dihînim. Der dihînîn. Der dihînit. Der bihîne, der bihînin. |
| **Derî** | (hk.cih,n.x) 1. Der. Dergeh.2 gelîyê teng. |
| **Derînan** | (k.jn.dar.mê) Derhînan. |
| **Derîzan** | (n.dar.mê) Hewş Asîtan. Derazînk. |
| **Derkar** | (nax.mê) Gundeke li devera Sindî - Zaxo. |
| **Derketin** | (k.jn.dar.mê) Derkevtin. |

| | |
|---|---|
| **Derkevtin** | (k.jn.dar.mê) 1.Tiştek, kesek yan candarek ji cihekî, avahîyekî bihêt der. Jê hatin der. 2. Peydabûn. : Corekê nû yê tirombêlan derkevtîye. (K) bn: kevtin. |
| **Derkirin** | (k.jmê) 1 Kesekî ji karê wî dûr bêxin. Ji mal derêxistin. Derêxistin.2 Peyda kirina tiştek nû. (K) bn: kirin. |
| **Derling** | (n.dar.nêr) Deling. |
| **Dermal** | (n.dar.mê) şirînî, xwarin û vexwarin hin caran pere û cilik, ku mala zavayî jibo mala bûkê di kin diyarî li dema nîşanîyê. |
| **Dermale** | (n.dar.mê) Pareyê mehane yê fermanberan. Heyvane. Mehyane. |
| **Dermalî** | (n.dar.mê) Xwarin û vexwarina mala zava jibo ya bûkê di şînin. |
| **Dermalkirin** | (k.jn.gl.mê) Xwedîkirin û sexbêrkirina kewalan di mal da, daku qelew bibin jibo firotin yan serjêkirinê. Ribêtekirin. Malofîkirin. (K) bn: kirin. |
| **Derman** | (n.x.mê) 1.Xwarin ,vexwarin, şirenqe û htd ji giya û candaran dihêt çêkirin jibo çarekirina mirov û gîyandarêd nexweş 2. Çare. Brx derd. : Dermanê çi jê nehatinê destdanane.derman dermale.dermanê nebûnê karê xudê ye. |
| **Dermanfiroş** | (kn.l.dz) Kesê dermanan di firoşe. Xwedîyê dikana dermanan. Xudan yan karmandê dermanxanê. |
| **Dermangeh** | (n.dar.mê) Cihê çêkirin û firotina dermanan. Dermanxane. |
| **Dermankar** | (kn.l.dz) Merivê dermanan çê dike. Pisporê çêkirina dermanan. |
| **Dermankarî** | (n.l.mê) Karê çêkirina dermanan. |
| **Dermankirin** | (k.jn.l.mê) Derman xistin ser birî cihêd kul .Derman dane nexweşan. : Nojdarî birîna birîndarî derman kir. (K) bn: kirin. |
| **Dermanxane** | (k.dar.mê) Dermangeh. |
| **Dermansaz** | (kn.l.dz) Kesê liser dermanan xwendî û dermanxanan kar diket. Dermankar. |
| **Dermansazî** | (n.l.mê) Dermankarî. |
| **Dernefîs** | (n.x.nêr) Cerbader. |
| **Dernexûn** | (hn.dar.çewa) Tiştê serê wî jibo xwar hatîye wergeran û binê wî jibo alê serî. Sernişîv. |
| **Dernexûnbûn** | (k.jn.gl.mê) Sernişîvbûn. : Cerrikê avê dernexûn bû. |
| **Dernexûnkirin** | (k.jn.gl.mê) Sernişîvkirin. Wergerandin. : Kabanî hêris bû, mencela xwarinê dernexûn kir. |
| **Derpê** | (n.l.mê) Kiras , cilikê mirv di kete berxwe ku her du lingan ta kemaxê di girit pitir cilikên şevê yan xewê çi dirêj yan kurt, libin pentor yan şelwalan diken û jibo melekirinê di avê de bikar dihêt.: Derpê jibo beqê çêkirin. |
| **Derpêdanan** | (k.jn.gl.mê) Li dema xwe şûştinê, xwe gihorînê yan karên din, mirov derpêyê xwe ji pêyên xwe dike. |
| **Derpêhavêtin** | (k.jn.gl.mê) Xwe bêderpêkirin. Bêfedî. Bêzax. Li derdan. |
| **Derpê-ji-pêkirin** | (k.jngl.mê) Derpêxistin. |
| **Derpê-li-pêkirin** | (k.jn.gl.mê) Derpê li pêkirin. Li ber xwe kirin. |
| **Derpêxistin** | (k.jn.gl.mê) Derpêdanan. Derpêdanîn. |
| **Derpî** | (n.l.nêr) Derpê. |
| **Derpoşk** | (nl.mê) dergehk. Dervank. |

| | |
|---|---|
| **Dersîm** | (cugrn.) Bajêreke li Kurdistana Turkî. |
| **Dersimî** | (malb.n) Xelkê Dersîmê. |
| **Dersok** | (nl.mê) cemedanî. |
| **Derşo** | (n.dar.nêr) Lîfikê pakijkirina amanan. Amanşok. |
| **Derûber** | (n.l.pir) Cihê mirov têda.Rexûçan. Çarçov. Biyav. |
| **Derûdor** | (n.dar.pir) Biyavê mirov di nav de dijît. Rexûçan. Dever. |
| **Derûn** | (n.x.nê) Nepenîyêd di nava mirovî da. Hêz û hizira navxwe.Can. Giyan. |
| **Derûnî** | (hn.dar.çewa) Kawdanêd girêdayî bi derûn ve.: Nexweşîyên derûnî. Êşandina derûnî. şerê derûnî. |
| **Derûnnas** | (karn.l.dz) Pispor di warî derûnî de.: Nojdarê derûnnas. |
| **Derûnnasî** | (n.dar.mê) Xwendin û karên girêdayî bi zanista derûnî ve. |
| **Derûnzan** | (karn.dar.dz) Derûnnas. |
| **Derûnzanî** | (n.dar.mê) Derûnnasî. |
| **Dervank** | (nl.mê) ew parça di êxin ser yan da dinin ser tiştî. Derok. Derî. Derxwînk. |
| **Derve** | (hk,cih.dar) Cih, yan tiştê ne li avahîyan da. : ne li jor. : dervey welat ; ang ne di nava tixûbên Welatî. |
| **Dervedan** | (k.jn.l.mê) Danpêdan. Danezan. |
| **Derveyî** | (hn.dar.çewa) Tiştê derve. Biyanî. |
| **Derwaze** | (n.dar.mê) 1. Galiske. 2. Dergeh. |
| **Derwêş** | (n.x.dz) 1. Mirîd. 2. Navê mêrane. Derwêşê Evdî, mêrxaseke stran pê hatîne vehandin. |
| **Derxwînk** | (nl.mê) dervank. |
| **Derya** | (n.x.mê) Gol, gomên avê yên mezin. Derya navîn . derya reş. Htd. |
| **Deryavan** | (pîşn.dar.dz) Mirov bi gemî û kelekan karî di nav deryayan da di kin. |
| **Deryavanî** | (karn.dar.mê) Karê deryavanan. |
| **Derz** | (n.x.mê) Valahî, peq, kelişte , ya dikevit cihekî , dîwarekî yan hestî. |
| **Derzî** | 1 (n.x.mê) Parçe asinek zirav û tîje jibo dirûna cilkan û karên malê bikar di hînin. Pend :Bîra bi derzîkê di kolin. |
| **Derzî** | (n.x.mê) şirenqeya lêdana leşî. |
| **Desnivêj** | (nl.mê) 1 bermayîyê xarina gîyandaran ê ku ji paşîyê der di keve.2 xwe şuştin bo nijêj kirinê, ez bi desnijêjin anku dişêm nivêjê bi kim. |
| **Dest** | (nax.nê) pişkek leşî bi baskan domahî di hên û çûtin, her êk ji pjênc tiblan pêkhatîye. (p): destê mino kesê mino. Destê mandî(westiyay) li ser zikê têre. Destê bi tinê deng jê na hêt.destê dizan bi dizan na hête birîn.destê li bin berîye. Dest destî di nasit. |
| **Destajo** | (hn.dar.çewa) Guhdar. |
| **Destakirin** | (k.jn.l.mê) Dema destên jin û mêran bi hev di kevin, divê desnivêjê dubare bigirin. : Tu bi xudê desta min ne, ez bi desnivêjim. (K) bn : kirin. |
| **Destan** | (n.x.mê) Dastan. |
| **Destar** | (n.x.nêr) Distar. |
| **Destav** | (n.l.mê) Cihê desnivêj û destûçav şûştinan. Tewalêt. : Dê çim destavekê. |
| **Destavêj** | (hn.l.çewa) Desthavêj. Gurzweşîn.Êrişkar. Hêrişvan. |
| **Destavêjî** | (hn.l.mê) Gurzweşandin. Hêrişkirin-birin. |

| | |
|---|---|
| **Desravêtin** | (k.jn.l.mê) Desthilandin. Hêrişkirin. (K) bn : avêtin. |
| **Destavgeh** | (n.gl.mê) Cihê destavê. Tewalêt. |
| **Destavkirin** | (k.jn.gl.mê) Çûn destavgehê. Çûn desnivêjê.Mîztin. Rîtin. (K) bn : kirin. |
| **Destavxane** | (n.gl.mê) Destavgeh. |
| **Destberdan** | (k.jn.l.mê) Heger mirov destan ji tiştekî berde. Bi cih bihêlit.Destdahêlan. : Ezê destan ji te brbidim, çunkî tu nabî mirov. (K) bn : berdan. |
| **Destberdayî** | (hk.l.çewa) Kesê gelek pere diravî bi mezêxit. Destbilindkirin (k.jn.gl.m) Xwe dane dest. Hatin ray |
| **Destbira** | (h.l.nr) Destebira. |
| **Destbizêv** | (hn.l.dz) Zeberdest. Desthil. : Ew palek destbizêve. |
| **Destçalak** | (hn.l.dz) Desthil. Destbizêv. Zeberdest. |
| **Destçepilandin** | (k.jn.l.mê) Destqutan. Destlêkdan. |
| **Destçînk** | (n.dar.mê) Sele ji parçeyên levenan hatî çêkirin. Zembîlk. |
| **Destdaman** | (k.jn.l.mê) Mitayê ku di destê mirovî de di mîne bi kêrî firotinê nahê, xerc nabit. |
| **Destdan** | (k.jn.l.mê) 1.Dema mirov destêd xwe li tiştek yan kesekî bixe,.. bide.Destlêdan. Desttêwerdan. Bi destan girtin.2. Desthijandin. Destleqandin. 3.Destûrdan. Rêdan. : Heger mamosta dest bide, ez dê sube li mal mînim û na herim xwendingehê.4. Destên hev girtin. Çûn destên hev. : Min silav kirê lê wî destê xwe ne da min, nizanim boçî yê sile. |
| **Destdeman** | (k.jn.l.mê) Destdaman. |
| **Destdeneman** | (k.jn.gl.mê) Weke çi pere û mal di destêd mirovî de nemîne.Hejarbûn. Bêperebûn. Belingazbûn. : Ez pir hez dikim alîkarîya te bikim, lê mixabin çi di dest min de nemaye. |
| **Destdirêj** | (hk.l.çewa) Mirovê destên wî di gehim hemû cih alîyan.1. matêker. 2. Zordar. |
| **Destdirêjkirin** | (k.jn.gl.mê) Dema kesek destên xwe dirêj ke ser mal û namûsa xelkî. Kirêtkirin. (K) bn: kirin. : Yê destên xwe dirêj biket ser axa me, dê destêd wî birîn. |
| **Deste** | (hk.x.mê) 1.Grop. Revde. Bir. : Desteyeka nû ji xortan ber bi xwendingehê ve çûn.2.Qeft. : Desteyeka gulan danî ser gora şehîdan |
| **Desteber** | (nl.n) 1. Berek hilîye didest xwe digirin bo hisîna dîwarên kurtanekirî da hilî û ciwan bibit.2 Kesê bo êkî desteberîyê dike. |
| **Desteberî** | (nl.mê) Dema mirovek xwe berpisyar hember kesek yan alîyekî di dane li cihê êkê din ku soz yan biryara liser bicih bîne, lê yê desteberî kirî li şûna wî dê hêt sizadan eger xwedîyê kêşê soza xwe bicih ne îna. |
| **Destebira** | (hn.l.nêr) Hevalek qenc, .. baş. Heval . Dost. Hevrê. Hevkar. |
| **Desteconî** | (nl.n) Berek dirêj û hulîye di destê xwe di girin li conî yê dan tê di din bo loçkirina danî ji sivîyê. |
| **Destedîvk** | (n.l.mê) Amêrekê cotyarane, liser hincarîye, li dema cotî cotyar destê xwe liser di danit jibo ragirtin û livandina hincarî. |
| **Destegir** | (n.l.mê) Berdestik. |
| **Destekirin** | (k.jn.l.mê) Destakirin. (K) bn : kirin. |

| | |
|---|---|
| **Destemo** | (n.dar.mê) Jin yan keça karê pakijkirina mal û avahîyan dike hember pereyî. |
| **Desteng** | (hn.l.çewa) Hejar. Destkurt. Belingaz. |
| **Destengî** | (n.l. mê) Hejarî. |
| **Destêduwê** | ( peyv.l) Cil û mitayên hatine bikar anîn. Kevinûnwî. |
| **Destêhevgirtin** | (k.jn.gl.mê) Weke du yan çend mirov destên xwe didin hev, mebest jê alîkarîya hev dikin. Bi hevre xebat û têkoşînê dikin. Li rojên teng divê em destêd hev bigirin. (K) bn: girtin. |
| **Destêxwetêdan** | (k.jn.gl.mê) Desttêwerdan. Matêkirin. |
| **Destgiran** | (hn.l.çewa) 1.Mirovê destê wî bi hêz dema gurzekî da diweşînit. 2. Kesê gelek hêdî kar û nivîsanê dike. Ne çeleng. |
| **Destgirêdan** | (k.jn.l.mê) Kelabçekirin. : Polîsan destêd dizî li pişt girêdan xistin nav girtîgehê.(K) bn : girêdan. |
| **Destgirtî** | (hn.l. çewa) 1.Çirîk. Brx Nandeh.2. Dezgir. |
| **Destgîr** | (n.dar.mê) Berdestik. |
| **Destgîrî** | (n.dar.dz) Dezgir. |
| **Destgork** | (n.dar.mê) Coreke goreyêd taybetin ji hirî yan pembû dihên çêkirin mirov jibo parastina destan ji sirê yan ciwanîyê,dikin destên xwe. Lepik. Destkêş. |
| **Desthelat** | (n.dar.mê) Desthilat. |
| **Desthilandin** | (k.jmê) li rojên tengavî pevdaçûnan mêrxas li meydanê çek bi destin û bexodanê diken. |
| **Desthilat** | (nl.mê) Kes yan partîyen her tişt di dest de. Serwer. Semyan. |
| **Destik** | (n.dar.nêr) Qeft. : Destikê gulan. Destikek pîvazterkan.destikekê nêrgizan. |
| **Destir** | (n.dar.mê) Berdestik. |
| **Destîcer** | (k.l.nêr) Gozik. Cerik.Kedîn. |
| **Destjêberdan** | (k.jn.gl.mê) Dema mirov destan ji tiştek yan karekî berde û bi yekcarî bihêlit.: Jiber ku ez nikarim wî karî bikin, min dest jê berda. : Em tu car destan ji xebatê bernadin. (K) bn : berdan. |
| **Destjêkişandin** | (k.jn.ggl.mê) Destjêberdan. (K) bn: kişandin. |
| **Destkar** | (hn.l.çewa) Zeberdest. |
| **Destkarî** | (nl.mê) Bi dest karek yan guhorînek têda bi hêt kirin. |
| **Destkarîkirin** | (k.jn.gl.mê) Mirov bi dest di tiştek yan karekî dixebitit û hin guherînan têda dike. Destkarî-têda-kirin.(K) bn: kirin. |
| **Destkevtin** | (k.jn.l.mê) wergirtin. Peydakirin. Bi destê xwe xistin. : Di çelengîyekê da gelek çek û kelûpelêd leşkerî kevtin destê pêşmergeyan. (K) bn : kevtin. |
| **Destkevtî** | (n.l.pir) Tiştê ku bi dest mirovî dikeve. Kelûpelên mirov ji xwe re peyda dike. : Destkevtîyêd we çi bûn di vî şerîda? |
| **Destkêş** | (n.dar.mê) Destgork. Lepik. |
| **Destkêşan** | (k.jn.l.mê) Xwe ji karek yan kiryarekê dan paş. Xwe jê dûrxistin. : Min destê xwe ji wî karî kêşan jiber ku yê bi sergêjî bo. : Destêd xwe ji karê xirab bi kêşe, heger dê poşman bî.Destjêberdan.(K) bn: kêşan. |
| **Destkişandin** | (k.jn.l.mê) Destkêşan. (K) bn: kişandin. |

| | |
|---|---|
| **Destkurt** | (hn.l.çewa) 1. Kesê ku çi pê çê nabit. Bê desthilat. Kêrnehatî.2.Hejar. Belingaz. : Ezman dirêjê destkurt; ang mirovî bi ezmanî pir soz dide di bêje, lê kiryar berevajîye. |
| **Destkurtî** | (n.l.mê) Hejarî. Belingazî. |
| **Destlêgerandin** | (k.jn.l.mê) Weke mirov bi destan li tiştekî bigerîne. |
| **Destlêkevtin** | (k.jn.l.mê) Dema dest bi tiştekî kevtin. |
| **Destlêweşandin** | (k.jn.l.mê) Desthejandin. Destleqandin. Destlêxistin. Teplêdan. Qutan. |
| **Destlêxistin** | (k.jn.gl.mê) Destê xwe lêdan. Destê xwe lê xistin. Destê xwe gihandinê. Bi destan girtin. (K) bn : xistin. |
| **Destlibakirin** | (k.jn.gl.mê) Destê xwe lê hijandin. (K) bn : kirin. |
| **Destlipiştxistin** | (k.jn.gl.mê) Dema mirov destê xwe li pişta yekî bixe, jibo destxweş û aferînî lê kirin. (K) bn: xistin. |
| **Destmal** | (nl.mê) Parçe pateyeke jibo malîn û zuha kirina destan . kefîk. |
| **Destmaye** | (n.l.nêr) Pare û malê di mirov de di mînit. Sermaye. |
| **Destmayedar** | (kn.l.dz) Mirovê yan dezgeh êdzengîn, xwedî mal û sentenet. Sermayedar. |
| **Destmêj** | (n.dar.mê) Desnivêj. |
| **Destmêjgirtin** | (k.jn.gl.mê) Desnivêjgirtin. (K) bn: girtin. |
| **Destnivîs** | (n.l.mê) Mijarêd bi dest dihên nivîsîn. |
| **Destpak** | (hn.l.çewa) Mirovê dilsax. Mirovê disoj. Mirovê bê ziyan. Mirovê çak. |
| **Destpaqij** | (hn.l.çewa) Destpak. |
| **Destpelink** | (hn.dar.çewa) Dema mirov li tarîsatanê çi na bînit, bi destan rêya xwe dizanit. Lepequt.: Bev tarî bo ez bi destpelinkê li pêlavêd we geryam. |
| **Destpelixî** | (hn.l.çewa) Tembel. Destkurt. |
| **Destpê** | (n.dar.mê). Berahî. |
| **Destpêk** | (n.dar.mê) Destpê. Berahîk. |
| **Destpêkirin** | (k.jl.gl.mê) Weke mirov dest bi karekî bike. : Evro wî dest bikarê xwe kir. (K) bn: kirin. |
| **Destpîs** | (hn.l.çewa) Mirovê bê rûmet. Mirovê destdirêj. |
| **Destşo** | (n.dar.mê) Cihê mirov destêd xwe têda di şot. |
| **Destûr** | (nl.mê) Rêdana mirovî ji karî bo heyamekê, bêhinvedanê. Rêdan. |
| **Destûrdan** | (k.jdar.mê) Dema mirov destûrîyê bi dit,yan ji yekî bi xwazit.(k) bn : dan. |
| **Destûrname** | (n.l.mê) Name yan karta bi awayê fermî destûr têda nivîsî ye. : Min destûname jibo mehekê wergirt da herim dervey welat. |
| **Destvala** | (hn.l.çewa) Mirovê nikarit çi bikit, çi senga xwe nebit çi pê çê nebit. Bê biryar. |
| **Destvank** | (n.dar.mê) Kelabçe. |
| **Destvekirî** | (hn.l.çewa) Nandeh. Merd.:Mirovek destvekirî. Jineka destvekirî. |
| **Desstxistin** | (k.jn.l.mê) bi Dests kevtin. Peydakirin. :Tirombêl bi dest xwe xist. (K) bn :Xistin. |
| **Destxistî** | (n.l.mê) Tiştê bi destê mirov di keve. Karê di keve destê mirovî. Serkevtina bi dest mirovî ve di hêt. :Fîdralîzim yek ji destxistîyên gelê meye. |
| **Destxwîşk** | (n.l.mê) Çêtirîn heval û dosta mirovî. |
| **Destyar** | (hn.l.çewa) 1. Alîkar. 2. Kêfxweş. Xwînşirîn. |

| | |
|---|---|
| **Deşt** | (cugrn.x.mê) 1. Cihê, erdê pan û rast. 2. Rast.Brx çîya. |
| **Deştî** | (dever,nav.) Xelkê li deştê dijîn. |
| **Dev** | (nax.nêr) Valayîya didan û ezman têda. Axivtin ûxwarin. : Devê xwe bi girire û ne peyve. |
| **Dev** | (pêrbest,alav.pêvegir) Li dev li nik, li rex. Li cem. Li ba. : Ew li dev babê xwe na mîne. Xandingeh li dev mala meye. |
| **Devavêtin** | (k.jn.l.mê) 1.Weke mirov yan lawir devê xwe bihavêjît tiştekî û leq bidet.Leqdanan. Geztin. 2. Bi gotinan hêrîş birin ser yekî. Dij axivtin.(K) bn : Avêtin. |
| **Devberday** | (hn.l.çewa) Mirovê çi nepenî xwe di devî de nagirin.Kesê ku gotinan ne li cih demên hejî diket. : Çi gotina li dev wî neke, ew mirovêk devberdaye. |
| **Devbeş** | (hn.n.l.dz.çewa) 1. Mirovê hertim devê wî vekirî. 2. Pirbêj. 3. Yê tuca ji xwarinê û gotinan têr nabe. 4.Devkenî. |
| **Devbeşkirin** | (k.jn.gl.mê) Devê xwe beşkirin. Devê xwe vekirin. (K) bn : Kirin. |
| **Devbixwîn** | (hk,hn.l.çewa) Hov. Xwînmêj. Dirinde. |
| **Devcîn** | (n.l.nêr) Benîşt. Qaçik. : Bi rêve di çit û devcînê xwe dicît.:Devcînê di devê kewalan da. |
| **Devcûn** | (n.l.nêr) Devcîn. |
| **Devdifink** | (n.l.mê) Dervankê biçûk yê derê şûşeyan. Tepedor. |
| **Devdirî** | (hn.l.çewa) Mirovê kêm di axivît. Mirovê kêmbêj. Mirovê hez ji axivtinê nake. |
| **Deve** | (n.x.mê) Hêştir. |
| **Devedeştî** | (n.dar.mê) Sergîn. |
| **Dever** | (cugrn.x.mê) Cihek diyar kirîye ji çîya, yan deştan pêk hatîye hin caran gund û bajêran bi xwe ve digirît. : Devera badînan. Devera amêdîyê. Devera Barzan û htd. |
| **Deverû** | (hn.dar.çewa) Sernişîv. Wergerayî. Berevajî. |
| **Deverûkirin** | (k.jn.gl.mê) Sernişîvkirin. Berevajîkirin. Serabinkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Devgem** | (n.dar.nêr) Hevsar. |
| **Devgenî** | (hn.l.çewa) 1.Kesê ku bêhna genî ji dev û hilma wî dihêt. 2.Mirovê ezmanreş. |
| **Devgilêj** | (hn.l.çewa) Mirovê gilêj ji devê wî di rêjit. |
| **Devgilîz** | (hn.l.çewa) Devgilêj. |
| **Devgir** | (hn.dar.çewa) Hin xwarinin tamek taybet heye di giran devê mirovî di girin. |
| **Devgirtek** | (n.l.mê) Dervank.Devdifink. |
| **Devgirtin** | (k.jn.l.mê) 1.Bêdengbûn. Bêdengkirin. Hi&bûn- kirin. Mitbûn-kirin. : Hema tu devê xwe bigire û ne axive. 2. Hin corên xwarinê mîna karî û fêqîyê negehiştî devê mirov di girit.(K) bn: girtin. |
| **Devik** | (n..n) 1 Devek yan keliştek biçûk. 2. Mûsên rihtraşînê. |
| **Devik** | (n.dar.nêr) Dervank. Derîk. Tepedor. |
| **Devikkêş** | (n.l.mê) Amêreke jibo deranîn yan kişandina devik (tepedor) ên derê şûşeyan(betil). |

| | |
|---|---|
| **Devilxwîn** | (hn.l.çewa) Devbixwîn. Devxwîn. |
| **Devî** | (n.x.mê).Dehil. Rêl.Tiraş. Bîşe. |
| **Devîstan** | (cugir,n.cih.n.dar) Cihê pir devî. Warê pir tiraş, giya,pîş û pelex. |
| **Devjêberdan** | (k.jn.gl.mê) Wekî mirovî karekî yan tiştekî bi cih bihêlit. Hêlan. : Ev pênc salin bapîrê min dev ji cigarekêşanê berdaye. : Zarokino ; dev ji karên xirab berden. (K) bn : Berdan. |
| **Devjihevçûn** | (k.jn.gl.mê) Jibo mirovê devberday dihêt gotin. |
| **Devken** | (hn.l.çewa) Yê ku hertim di kene.Mirovê pir di kenit. Rûxweş. Keyfxweş. |
| **Devkenî** | (hn.l.çewa) Devken. |
| **Devkenok** | (hn.l.çewa) Devken. |
| **Devkevçik** | (n.l.nêr) Kevçik. Kefgîr. |
| **Devkî** | (hn.dar.çewa) Dema peyv û gotar, bi dev dihên gotin û belavkirin. |
| **Devlêkirin** | (k.jn.gl.mê) Tamkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Devlixwîn** | (hn.l.çewa) Devbixwîn. |
| **Devlo** | (ndar.mê) derz yan devek biçûk dem dikevit çerm, qayîşa yan lastîkan. |
| **Devkenî** | (hn.l.çewa) Beşoş. Debeng. |
| **Devok** | (n.dar.mê) Zimanê xelik li deverekê bikar dihînin.Zar. |
| **Devpîs** | (hn.l.çewa) Kesê gotinên pîs, bêrûmet ji dike.Bêhetik. Xeberreş. Bêdeling. |
| **Devpoş** | (n.l.mê) Dervan. Derpoş |
| **Devrû** | (n.l.nêr) Serûçav.Dirûşm. |
| **Devşêr** | (n.l.mê) Core guleke mîna devê şêrane. bn :Mînakî. |
| **Devtijî** | (hn.l.çewa) Mirovê kêm axivtin. Bêdeng. Mit. |
| **Devûlêv** | (n.gl.mê) Dev û lêv. |
| **Devûlêvkirin** | (k.jn.gl.mê) Livandina dev û lêvan. Dirêj û gurc kirina dev û lêvan. (K) bn: Kirin. |
| **Devûrû** | (n.gl.mê) Devrû. |
| **Devxwîn** | (hn.l.çewa) Devbixwîn. |
| **Devzêrîn** | (hn.l.çewa) Kêfxweş. Tiraneker. Devxweş. |
| **Dew** | (nax.mê) ji têkşêlana mast û avan peyda di bit, çi bi meşkê yan amanek din bû vexwarinê bi kar tê. |
| **Dewank** | (n.dar.mê) Dervank. |
| **Dewar** | (hnx.g) gîyadarên mezin wek hesp, hêstir û ker. |
| **Dewdew** | (n.dar.dz) Pepegay. Totî. |
| **Dewen** | (n.x.nêr) Dehil. |
| **Dewik** | (n.x.nêr) Dewê meşkê. |
| **Dewiqîn** | (k.jn.x.mê) Gehiştin, helbûn yan zerbûna fêqî. : Ev sêve ya tirşe, ango ne dewiqîye. |
| **Dewisîn** | (k.jn.x.mê) Givaştina tiştan bi dest, pê yan amêran. Liser hev givaştin.di navêkdabirin. (K) Br,db :Ez di dewisînim, em di dewisînin,tu di dewisînî, hûn di dewisînin, ew di dewisînit(…ne) ewan di dewisînin.Pr: Dê bi + berd,db. Db: Di deswisand, di dewisandin. Db,dûr: dewisandibû, … bûn. (F) : Bi dewisîne, bi dewisînin. |

| | |
|---|---|
| **Dewisîn** | (k.jn.x.ê) Tiştê bi giranî û hêz bihêt pestin.Givaştin. : Banê jiber baş ne hatîye dewisîn, dilopan dike. |
| **Dewixandin** | (k.jn.x.mê) xwe tê alandin.Dest li hevkê nan. Xiniqandin. |
| **Dewixîn** | (k.jn.x.mê) Di hêt dewixandin. |
| **Dewîn** | (nax.mê) Xwarinek kurdîye ji dewî tê çêkirin, dew û dan . |
| **Dewjin** | (n.l.nê) Dewê meşkê. |
| **Dewkî** | (hn.dar.çewa) Dema giyanê mirovî rengê mîna dew di girit, jiber germê yan mandîbûnê. |
| **Dewkîs** | (n.l.nêr) 1. Dewê zuha di nav tûrikan de.2.Lûrik. |
| **Dewlemend** | (hn.dar.çewa) Zengîn. Hêyî. |
| **Dewlemendbûn** | (k.jn.l.mê) Zengînbûn. |
| **Dewlemendî** | (n.dar.mê) Zengînî. |
| **Dewlemendkiri n** | (k.jn.l.mê) Zengînkirin. |
| **Dewlet** | (n.x.mê) Welat. Deshelat. |
| **Dewlik** | (n.x.mê) Amaneke naylon yan asine, şêweyê lûlîye avê, avemastê û corên xo&av(vexwarin) an tê dikin. |
| **Dews** | (n.x.mê) Bopa li cihê piyên mirov û lawiran peyda dibe.Bûnpê.Bwînpê. |
| **Dewsgirtin** | (k.jn.mê) Li ser dewsê ya rêçê çûn. Cihgirtin. Fêrbûn. : Wî dewsa babê xwe ya girtî. (K) bn: girtin. |
| **Dexel** | (n.x.mê) Gîyayên ziyano dinav bax û rezan ku ziyanê di gehînin çandinê. |
| **Dexes** | (hnx.dz) mirovê zikreş. |
| **Dexil** | (n.x.nêr) Dan. Genim û ceh. |
| **Dexsî** | (hn.x.çewa) Dema mirovek, nemaze zarok li cihek gelek bi mît û hêris bibit.Mandî. westayî. |
| **Dexsîbûn** | (k.jn.l.mê) Dema mirov mandî î dibit. K): ez dexsî di bim em dexsî di bîn, tu dexsî dibî hûn dexsî dibin, ew dexsî dibit ewan dexsî dibin. (F): bibe bibin. |
| **Dexsîkirin** | (k.jnlmê) Bi cih ne hînana daxazên mirovekî,zarokek :We ev zaroke di jor ve dexsî kir, bêhnekê bibin der.Hêriskirin.(K): bn :Kirin. |
| **Dexso** | (hn.dar.çewa) Zikreş. |
| **Dexsoyî** | (n.dar.mê) Zikreşî. |
| **Dey** | (n.x.mê) Deng. : Çima tu dey nakî ?. |
| **Deyatî** | (n.dar.mê) Daykatî. Dayînî. |
| **Deybab** | (nl.g) Cot gîyandarên nêr û mê yên zaro yan têjik jê peyda dibin. Deyk û bab. |
| **Deydik** | (n.dar.mê) Dêdîk. Colank. |
| **Deykirin** | (n.jn.l.mê) Peyvîn. Lê xurîn.Dengkirin. Axivtin. (K) bn: Kirin. |
| **Deylêkirin** | (k.jn.gl.mê) Deykririn. |
| **Deyn** | (n.x.nêr) Pere yan malê mirovî li cem yekî bit, divê jibo xwedî bihêt vegerandin. : 200 dînar deynê hevalekî li mine. |
| **Deyndan** | (k.jn.l.ê) Dema mirov deynekî bi de yekî. : Mamê min 1000 dînar bi deyn dane min. (K) bn: Dan. |

| | |
|---|---|
| **Deyndar** | (hk.dar.çewa) Mirovê deynê êkî (pare yan mal) lê bit. : Min pê çênabit xanî bi kirin, jiber ku ez deydarim. |
| **Deyndarî** | (n.dar.mê) Weke mirov li bin deynan ve be. Perê xelkî li cem mirov be. |
| **Deynder** | (hk.dar.çewa) Mirovê deynan dide xelkî. Kesê perê wî li xelkî bit. |
| **Deyngirtin** | (k.jn.l.mê) Mirov pere û malî ji yekî yan dezgehekî bi deyn wergire. (K) bn: Girtin. |
| **Deynkirin** | (k.jn.l.mê) Deyngirtin. : Min tu deyn ji kesekî ne kirîne.(K) bn: Kirin. |
| **Deyûz** | (hn.x.çewa) Kesê rêberîya karên kirêt jibo xelkî dike, mina gehandina jin û mêran jibo guhnelî ya ne rewa, hember parey. Dezgah (n.dar.mê) Dezgeh. |
| **Dezgeh** | (hkcihl.mê) Deste ya bi rêvebirina çelengîyan.Kargeh, rêvebirî, cih, Sazî.htd. |
| **Dezgehdanan** | (k.jn.gl.mê) Danan yan avakirina dezgehan. (K) bn: Danan. |
| **Dezgehdanîn** | (k.jngl.mê) Dezgehdanan. (K) bn: Danîn. |
| **Dezgehîkirin** | (k.jmê) Dema mirov yan deshelat dezgehan ava ke.Serbixwekirina dezgehan. (k) bn: kirin. |
| **Dezgehvan** | (n. dar. dz) Danerê dezgehê. Avakerê dezgehê. Birêvebirê dezgehê |
| **Dezgir** | (n.dar.dz) 1 Keça xastî, yan kurê jibo keç xwastî, gustir li tiblê yan hez ji hevdu biken. : Dezgira hevalê min li zanîngehê di xwînit. |
| **Dezî** | (nax.nê) Bendikê zirav ku jibo dirotina cilan bikar dihet. Ta. Dav. |
| **Dê 1** | (nx.mê.hkd)Dayk . |
| **Dê 2** | (alav.dem) Dema dihêt. Paşî. : Paş meheka din ez dê herim dervey welat. : Ez dê sube çim karwanî. |
| **Dê3** | Alavê girêdanê kû mirov digel boçûnekê be. Dê başe. Erê dê. Dê vêca bes dirêj ke, te serê min gêj kir. |
| **Dê4** | (alv) Alaveke jibo daxazê bikar dihêt. : Dê tu bi xudê sube were mala me. |
| **Dê 5** | (hk.dem,cugr,n.x.nêr) Gund. |
| **Dêbav** | (n.l.pir) Dayk û bav. Dayk û bab. Daybab. Deybab. |
| **Dêdîk** | (nl.mê) cihekê asinî yê nivistina zarokan. Core landikeke. |
| **Dêh** | (n.x.nêr) Gund. Dê. |
| **Dêhlik** | (nax.mê) Seya mê. Kûçika mê. |
| **Dêjîn** | (kj.mê) 1.Daxaza berdewamîya jîyanê. 2.Navê kiçane. |
| **Dêkane** | (n.x.mê) Coreke çirika darane gelek nîseke liser cih tayên daran di danin jibo girtina çûçik û teyran. Bêwkane. |
| **Dêl** | (n.x.mê) Dêhlik. |
| **Dêleba** | (n.l.mê) Heyama gunelîya dêl û segan. |
| **Dêlegur** | (n.l.mê) Mêgur. Mêgurg. |
| **Dêlemar** | (n.l.mê) 1. Mara mê. Mêmar.2. Bîkmar. |
| **Dêleşêr** | (n.l.mê) Bêra mê. |
| **Dêm 1** | (n.x.nêr) Serûçav. Rû :. Sîma. |
| **Dêm 2** | (hn.x.çewa) Cihê yan şînkatîyê liser baranê di jît. Ne avî. |
| **Dêman1** | (n.dar.mê) Dirotina dexil û danî. |
| **Dêman 2** | (n.dar.nêr) Serûçav.Dêm. |
| **Dêmarî** | (n.dar.mê) 1.Jinbab.2. Dayîn. |

| | |
|---|---|
| **Dêmacame** | (n.l.mê) bn : Dêmcane |
| **Dêmcane** | (n.l.mê) Perûkek çaralî bi daranve asê û tund kirîye û weneyê mar ûadîyan li ser kêşayîne daû dama ravê gîyandar ji tirsa xwe xirve ken û nêçîrvan hijmarek pitir bi kujit. |
| **Dêmdirêj** | (hn.l.çewa) Jin yan peyayê dêmê wê/wî dirêj be. |
| **Dêmî** | (n.dar.mê) Erdê dêm. Zevîya dêm. |
| **Dêmxir** | (hn.l.mê) Mirovê dêmê wî girovir be. |
| **Dên** | (n.x.nêr) Deyn. |
| **Dêr** | (n, cugrn.x.mê) 1. Perisgeha felan. 2. Gund. |
| **Dêran 1** | (cugr,n.dar.nêr) Gund. |
| **Dêran 2** | (hn.dar.çewa) Wêran. Xirabe. |
| **Dêran 3** | (hn.dar.çewa) Lewaz. Bêçare. |
| **Dêrandin 1** | (n.jn.dar.mê) Dema dilopêd avê ji erdekî di derkevin. : Gozikê me gelek avê di dêrîne. |
| **Dêrandin2** | (k.jn.dar.mê) Çandin. Tovkirin. Nemamkirin. |
| **Dêrelok** | (hk.cih.cugr,n) Bajêrkeke li devera badînan. |
| **Dêrelokî** | (malb.n.dar) Xelkê dêrelokê. |
| **Dêrik** | (hk.cih,cugraf,n.mê) 1. Gund. 2.Bajêrek Kurdistana Suryê. |
| **Dêrs** | (hn.x.çewa) Pîs. Gemar. |
| **Dersbûn** | (k.jn.l.mê) Pîsbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Dêrsim** | (hkc.cugrafn.nl.mê) Bajêrek Kudistana turkî ye. |
| **Dêrsimî** | (malbn.dz) xelkê Dêrsimê. |
| **Dêrsbkirin** | (k.jn.l.mê) Pîskirin. (K) bn: Kirin. |
| **Dêrşew** | (hk.cih.cugrafn.mê) Gundeke li Kurdistana bakûr. |
| **Dêrşewî** | (malbatnl.dz) Xelkê dêrşwê. |
| **Dêrzeman** | (hkdl.mê) Demek ji mêje. Demek gelek dûr. |
| **Dêtî** | (n.dar.mê) Daykînî. Dayînî. |
| **Dêv** | (n.x.nêr) Dêw. |
| **Dêvzime** | (n.dar.nêr) Gapîsk. |
| **Dêw** | (n.x.nêr) 1.Helametekê evsaneyî yê liser erdî yan firindeye alîkarîya qehremên çîrokî di kir jibo vegustina wan. Caran jî bervajî, bi karên xirab di rabû.2. Çembera mirovê zelelah û bihêz. |
| **Dêwane** | (hn.dar.çewa) 1. Kesê mîna dêwan bi hêz û zebelah. 2. Dîn. şêt. |
| **Dêze** | (hn.x.çewa) Kesê reştale. Esmer. |
| **Dêzereş** | (nl.dz) Kesê gelek reş. Reşqelayî. |
| **Dêzê** | (hn. Gazî.dar.mê) Jina dêze. Reş. |
| **Dêzo** | (hngazî.dar.nêr) Zelamê dêze. |
| **Di** | (pb.alv.g) rêzman Pêşpirta kirinane . di kem , di çe. Di xwen. Dihên. : Min di dilê xweda di got. |
| **Dibe** | (Allav. misogerkirin) rêzman Dibit. Brx nabe. |
| **Dibistan** | (hkl.cih.mê) Xandingeh. Qutabxane. |
| **Dibit[dibe]** | (alv.mis) Çê di bit.: Dibit evro ezê li mal bim. Brx nabit. |

| | |
|---|---|
| **Didan** | (n.x.nêr) Hestîyê sipî di devê candaran da, jibo hêrana(cûna) xwarinê. Didanêd mezinan 32.Didanêd şîrî, didanên zaroyan ji jiyê çend meh tanî 6 sal. |
| **Didansaz** | (kar,n.dar.dz) Pispor di warê çêkirina didanan da. Nûjdarê didanan. |
| **Dido** | (hij.n.x) Hijmara du. Du. 2. |
| **Didoyan** | (hij.n.dar) Yêd/yê/ya duyê. : Xanîyê yekê ne,ê didoyan yê apê mine. |
| **Difin** | (n.x.mê) leş Hedamê hesta zanîna bêhin, bêhinînanînûbirinê. Kepî. Kepo. Lût. Poz. |
| **Difinbilind** | (hn.l.çewa) Mirovê xwe mezin dike. Mirovê ji xwe zêde bi bawerî. :Ev çi zelamekê difinbilnde. :Jineka difinbilind. |
| **Dihindan** | (k.jn.x.mê) Reqkirin. Peytkirin. |
| **Dihlik** | (n.dar.mê) Dêhil. Seya mê. |
| **Dihol** | (n.dar.mê) Duhol. Def. |
| **Dij** | (hk.x.çewa) Her karek ne di gel vîyana mirovî. Brx berdij. : Divê em hemû dij erebandina Kurdistanê bi westin. Hevrik. |
| **Dijane** | (hk.dar.çewa) Berevajî. |
| **Dijatî** | (n .dar.mê) Weke mirov dij karekî be. Rikatî.:Dagîrker dijatîya me di kin. |
| **Dijber** | (hn.dar.çewa) Beevajî. Rikeber. Berdij. : Dijbera ; were ×here. |
| **Dijberî** | (n.dar.mê) Berdijî. Berevajî. |
| **Dijgiranî** | (n.l.mê) Dema giranî ya du tenêd hevberkirî ne mîna hevbin. Tayêd terazîyê ne wek hev di giran bin. |
| **Dijî** | (hn.x.çewa) Dij. |
| **Dijmin** | (n.x.dz) Dujmin. Neyar. Xwîdar. : Dagîrkerên Kurdistanê dijminêd me kurdanin. |
| **Dijminayî** | (n.dar.mê) Kiryarên dijminkarî. |
| **Dijminkarî** | (n.l.mê) Kar û kiryarên dijminane. Dijminayî. |
| **Dijrabûn** | (k.jn.gl.mê) Hember kesekî mîna dijminî serederî kirin. (K) bn: Rabûn. |
| **Dijûn** | (n.x.mê) Civîn. Sixêfî. Xeber. |
| **Dijûndan** | (k.jnl.mê) Civîndan. Sixêfîdan. Xebergotin. : Mirovê ezmanpîs herdem dijûnana di de.(K) bn: Dan. |
| **Dijûnkirin** | (k.jn.l.mê) Xebergotin. Dijûndan. (K) bn: Kirin. |
| **Dijwar** | (hn.x.çewa)1. Tiştê har,tîj.Tund. Zirek. :Bîber dijware. Pîvaza dijwar. :Mirovê dijwar. 2. Navê kurane. |
| **Dikan** | (hk.cih.mê) Cihê firotina û kirîna kelopelan.firoşgeh.: Li taxê me pir dikan hene. : Dikan li rex mala meye. |
| **Dikandar** | (pîşn.dar.dz) Xwedî yan mirovê liber dikanê kar dike. : Dikandarî dikan vekir. |
| **Dikandarî** | (karn.dar.mê) Kesê pîşe yan karê li ber dikanê diket.:Dikndarî karekê dilvekere. |
| **Diktator** | (hn.biyanî.dz)) Mirov yan desheta mafê mirov û civakê şêl diket. Deshelata tekrewî. |
| **Diktatorî** | (n.dar.mê) Rijêm yan sistema takrewî. |
| **Diktor** | (pîşn.biyan.dz) Nojdar. Dixtor. |

| | |
|---|---|
| **Diktorî** | (kar,n.dar.mê) Nojdarî. Dixtorî. |
| **Dil** | (n.x.nêr) 1.Endamek leşî ye dinav sebeteya singî da, mîna pempekî xwînê di havêje canî û di vegerîne,.: Ez di dilê xweda di bêjim. 2. Sûz. Viyan. Hezkirin.: Dilê min gelek bi hejaran dişewite. :Pend :dila dilan di evîne. Pend :Dil pîr nabit. |
| **Dilandin** | (k.jn.dar.mê) Mirov zaro( kur û keç) yan candaran bi nazî xwedî bike û serederîyê pêra bi ke. Nazkirin. Nazikkirin. Nazandin. Nazdarkirin. Dindilandin. Ez di dilînim hûn didilînin,ew di dilîne,…. . |
| **Dilawer** | (hn,çewa.dar.) 1. Mêrçak. Wêrek. Çavnetirs. 2. Navê mêrane. |
| **Dilawerî** | (n.dar.mê) Mêrxasî. |
| **Dilazad** | (hn.l.çewa) Mêrçak. Dilşêr. |
| **Dilbawer** | (hn.l.çewa) Mirovê zû bawerîyê bi hemberê xwe dihînit.Dilnazik. |
| **Dilbaz** | (hn.l.çewa) Mirovê,xasime keça bi cilik û rapêça xwe bala mirovî di kişîne. |
| **Dilbazî** | (n.l.mê) Kesê xwe dilbaz bikit.Nazdarî. |
| **Dilbazîkirin** | (k.jn.gl.mê) Nazkirin. Xwe tivtivandin. (K) bn: Kirin. |
| **Dilbend** | (hn.l.çewa) Evîndar. |
| **Dilbendî** | (n.l.mê) Evandin. Evînkirin. |
| **Dilber** | (hn.nl.mê) 1. Pesidana şox û şengîya jinan. Ciwan . Xweşk. Naz.2. Dilreq. Evînçirîk. |
| **Dilbijîn** | (hn.l.çewa) Kesê dilê wî bi çit tiştekî. Dilvekirin. |
| **Dilbirîn** | (hn.çewa,n.l) 1.Dilê birîndar. bi kovan, Xem ,pejare. 2. Navek kurdî ê kurane. |
| **Dilborîn** | (k.jn.l.mê) Bêhoşbûn. Bêhişman. Hay ji xwe neman. Dilgirtin. (K) bn: Borîn. |
| **Dilçepel** | (hn.l.çewa) Zinx. Tamsar. |
| **Dilçirmisî** | (hk.l.çewa) Bêgêwil. Posîde. |
| **Dilçirmisîn** | (k.jn.l.mê) Bêgêwilbûn. Mirîtûbûn. (K) bn: Çirmisîn. |
| **Dilçûn** | (k.jn.l.mê) Dema mirov di xwazit xwarinekê bi xwe. : Dilê min gelek di çit savarê. Dilê wî naçe îpraxa. (K) bn: Çûn. |
| **Dildan** | (k.jn.l.mê) Weke mirov dilê xwe dide yekî. Mirov hez ji êkî biket. : Wî dilê xwe daye keça mezinê gund. Gulê min dil daye te, ev çend salin ez li benda te.(K) bn: Dan. |
| **Dildar** | (hk.n.l.çewa) 1. Evîndar. 2. Navê kuran. |
| **Dildayî** | (n.l.mê) Dildar. |
| **Dilevîn** | (hn.l.çewa) Kesê evîn ketî dilê wî. Evîndar. |
| **Dilêr** | (hn.dar.çewa) Aza. Dilşêr. Dilawer. |
| **Dilêş** | (hn.l.çewa) 1. Mirovê posîde. Birîndar. Kovandar.2.Mirovê bi gotinan xelkî birîndar diket, dilê mirovî di êşînit. |
| **Dilêşandin** | (k.jn.l.mê) Gêwilşikandin. Paşvebirin. Birînkirin..: Tu bi wan gotinan dilê min û yê di êşînî. (K) bn: Êşandin |
| **Dilfireh** | (hn.l.çewa) Mirovê bêhinfireh. Singvekirî. Liser xwe. Merd. Bi aram. |
| **Dilfirehî** | (n.l.mê) Bênfirehî. |
| **Dilgerm** | (hn.l.çewa) Mirovê xwedî têhin û hêz.Geşbîn . Xurt. Çeleng. |
| **Dilgermî** | (n.l.mê) Çelengî. Zîrekî. geşbînî. |

| | |
|---|---|
| **Diledildan** | (k.jmê) kêmkirina xema mirovê dilteng yê ku tiştek lê qewimî. dilnerimkirin. Ji bîrbirin. Bn: dan. |
| **Dilgeş** | (hn,nl çewa)1.Kesê dilê wî xweş. Keyfxeş. Geşbîn.2 navê mêran. |
| **Dilgeşî** | (n.l.mê) Kêfxweşî. |
| **Dilgir 1** | (hn.l.çewa) Zadê giran dema mirov pê gêj di bit.. Xwarina pir çevir. |
| **Dilgir 2** | (hn.l.çewa) Mirovê di dilê xweda mezin, qebe. Ji xwe razî. |
| **Dilgiran** | (hn.l.çewa) Mirovê sil. Mirovê Tore. Mirovê hêris. : Mamostayê min ji min dilgirane, jiber ku min waneyên xwe ne nivîsbûn. |
| **Dilgiranî** | (n.l.mê) Silbûn.Hêrisbûn. |
| **Dilgirtin** | (k.jn.l.mê) 1. Silbûn. 2. Bêhoşbûn. Jibîrveçûn. 3. Li hevhatin. Pêkhatin. |
| **Dilgîr** | (hn.dar.çewa) Sil. Hêris. Tore. |
| **Dilhebûn** | (k.jn.l.mê) Dema mirovî gêwil hebit jibo karekî. : Min dil heye sube herim çem birayê xwe bi mêvanî. |
| **Dilhesin** | (hn.l.çewa) Kesê dilê sî req mîna asinî.Dilreq. Dilqayîm. |
| **Dilhêlan** | (k.jn.l.mê) Weke mirov dilê êkî bi gotinêt gemar bi şikênit. Dilşikandin. Birîndarkirin. : Bibore eger min dilê te hêla bit. :Tu bi xudê dilê wê ne hêle.(K) bn: Hêlan. |
| **Dilhişk** | (hn.l.çewa) Dilreq. |
| **Dilhiştin** | (k.jn.l.mê) Dilhêlan. |
| **Dilik** | (n.dar.nêr) 1. Nazik yan biçûk-kirina dilî.2. Wêneyê dilî liser ristik û stovankan, ku mirov bi dest yan stoyê xwe ve diken. |
| **Dilikkirin** | (k.jn.l.mê) Nazkirin. Piçûkkirin. Dilandin. Dindilandin. (K) bn: Kirin. |
| **Dilînî** | (hn.dar.çewa) Sozdarî. Hest. :Stiraneka dilînî. :Helbestena dilînî. |
| **Dilîr** | (hn.dar.çewa) Dilêr. |
| **Diljar** | (hn.l.çewa) Kovandar. Dilkul. |
| **Diljarî** | (n.l.mê) Dilşikestin. Kovan. |
| **Dilkevir** | (hk.l.çewa) Dilreq. Dilêwî mîna keviran reqe. |
| **Dilkevtin-ketin** | (k.jn.l.mê) Dema dilê mirovî kesekî yan tiştekî bi xwazit. : Dilê gelek ketîye tirobêla te. (K) bn: kevtin- ketin. |
| **Dilkevtî** | (hn.l.çewa) Dildar. Evîndar. |
| **Dilkêş** | (hn.l.çewa) Balkêş. Xweşik. |
| **Dilkirin** | (k.jn.l.mê) Hezkirin.Viyan. Xwaztin. (K) bn: Kirin. |
| **Dilkişandin** | (k.jn.l.mê) Hezkirin. |
| **Dilkul** | (hn.l.çewa) Dilşikestî. Dilbirîn. Dilçirmisî. Kovandar.:Jineka dilkul.Mêrekê dilkul. |
| **Dilkulî** | (n.l.mê) Derd. Kovan. |
| **Dilkutan** | (k.jn.l.mê) Lêdana dil. Qutana dilî. |
| **Dilkutîn** | (k.jn.l.mê) Dema dil lê dide. Qutana dilî. Dilqutan. |
| **Dilkuzrandin** | (k.jn.l.mê) Dilsotin. Dilşewitandin. :Te dilê kuzrand bi wan gotinan. (K) bn : Kuzrandin. |
| **Dilkuzrîn** | (k.jn.l.mê) Dema ji kovanekê yan çamekê dilê mirovî di şewite. : Çend ez wî zarokî di bînim, dilê min di kurrit, çunkî babê wî dihêt bîra min. Dilsotin.(K) bn : Kuzrîn. |

| | |
|---|---|
| **Dillihevkevtin** | (k.jngl.mê) Hez ji hev kirin. Hevdu viyan. Dilêd wan kevtin hev. |
| **Dilman** | (k.jn.l.mê) 1. Silbûn. Posîdebûn. Hêrisbûn. ; Ez nizanim çima dilê wî ji min maye ?. Dilê te ne mînit ez dê te ji karî deêxim.2. Navek kurdî ye. |
| **Dilmezin** | (hn.l.çewa) Mirovê merd û singfireh. Hêja. Dilovan. |
| **Dilmezinî** | (n.l.mê) Dilovanî. Singfirehî. |
| **Dilmê** | (hn.dar.çewa) Nazik. Xav. : Hêka dilmê. |
| **Dilnas** | (kar,n. l.dz) Pisporê nexweşîya dilan. Nûjdarê dilan. |
| **Dilnasî** | (n.l.mê) Zainîn û xwendina li dor dilî tê kirin. |
| **Dilnazik** | (hn.l.çewa) Dilînî. : Ew mirovek hinde dilnazike, çi caran neşêt guhdarîya dengê şêxoy biket. Pend :Dilê nazik negehit çi miradan. |
| **Dilnerim** | (hn.l.çewa) Dilovan. Liser xwe.Singfireh. Dilnazik. Brx dilreq. |
| **Dilnerimkirin** | (k.jn.gl.mê) Diledilîdan. Dilxweşkirin. (K) bn : Kirin. |
| **Dilop** | (n.x.mê) Çipik. Çilk. Çipikêd avê. |
| **Dilopandin** | (k.jn.l.mê) Bi amêran avê dilop dilop bi fîteran paqij û bijîn di kin jibo vexwarinê. |
| **Dilopandî** | (hk.dar.çewa) Ava bi dilopandinê hatî bijîn kirin. Ava paqij. Ava bijîn. |
| **Dilopkirin** | (k.jn.l.mê) Dema dilopên avê ji cihekî di kevin. : Banê me li biharan dilopan diket. (K) bn : Kirin. |
| **Dilovan** | (hn.l.çewa) 1. Dilsoz. Sozdar.2 Navê kuran. |
| **Dilovanî** | (ndar.mê) Sozdarî. |
| **Dilpak** | (hn.l.çewa) 1. Dilsoz. 2. Navek kurdî hevpişke. |
| **Dilpakî** | (n.l.mê) Dilsojî. Dilsozî. |
| **Dilpîs** | (hn.l.çewa) Kumreş. Çavnebar. |
| **Dilpîsî** | (n.l.mê) Kumreşî. Çavnebarî. |
| **Dilqijîn** | (n.dar.mê) Derdeke ku zik(geda) mirovî jan dike. Di sojit. Di şewite. Janegede. Janezik. |
| **Dilqusîn** | (n.dar.ê) Dilqijîn. |
| **Dilrabûn** | (k.jn.l.mê) Hilandin. Hilavêtin. : Jiber xwarina zadê kevin dilê rabû. |
| **Dilrast** | (hn.l.çewa) Rastgo. Vekirî. Dilsax. |
| **Dilrastî** | (n.l.mê) Dilsaxî. |
| **Dilrawestan** | (k.jn.l.mê) Dema dilê mirovî yan candaran ji lêdanê di rawestit. : Dilê wî ji lêdanê rawesta û malavayî li me kir. |
| **Dilreş** | (hn.l.çewa) 1. Mirovê ne dilsax. 2. Zadê pîs, gemar. |
| **Dilreşbûn** | (k.jn.gl.mê) Dilê mirov ji kar,tişt, xwarin yan yekî reş bibe; mirov wî na xwaze. Xwe jê dorxistin. (K) bn: Bûn. |
| **Dilreşî** | (n.l.mê) Pîsî. Gemarî. |
| **Dilreşkirin** | (k.jn.gl.mê) Mirov dilê xwe ji tiştekî, zadekî reş kit; ango mirovî ew tişt êdî nevêt..: Dilê xwe ji zadî reş reş neke. (K): Kirin |
| **Dilron** | (hn.l.çewa) 1. Mirovê zû di zanînan wer bi girit.şareza.2. Dilvekirî. Bêguneh. |
| **Dilsax** | (nl.mê) kesê çi xirabî di dilîda nebit. Bê guneh. |
| **Dilsaxî** | (n.l.mê) Bêgunehî. Sadeyî. Rasgoyî. |
| **Dilsar** | (hn.l.çewa) Kesê bê hîvî. Reşbîn. Brx dilgerm. |

| | |
|---|---|
| **Dilsarbûn** | (k.jn.gl.mê) Dil jê sar bûn.Wekî dilê mirovî ji karekî sar bi bit. : Dilê wî ji xwendinê sar bûye, lewra ne vêt herit xwendingehê. (K) bn: Bûn. |
| **Dilsarî** | (n.l.mê) Reşbînî. Bêgêwilî. |
| **Dilsarkirin** | (k.jn.gl.mê) Bêhîvîkirin. Gêwilşikandin. : Heger dilê xwe sar key, tu neşêy liser karê xwe berdewam bî!. (K) bn: Kirin. |
| **Dilsotin** | (k.jn.l.mê) Kovanên mezin. Çam . Derd. Dilşewat. |
| **Dilsoz** | (hn.l.çewa, n.l.dz) 1. Yê dilê wî bû dozek hejî di şewute. sozdar. Perwer.2.Navek duzayende. |
| **Dilsozî** | (nl.mê) Perwerî. Dilsojî. Nîştimanperwerî. |
| **Dilşa** | (hn.l.çewa) 1. Bi keyf. Kêfxweş. 2. Dilmezin. 3. Navek du zayend. |
| **Dilşad** | (hn.l.çewa) 1.Kefxweş. Navê mêrane. |
| **Dilşayî** | (hn.l.çewa) Dilşa. |
| **Dilşewat** | (hn.l.çewa) Dilsoj. Kovan. |
| **Dilşewitandin** | (k.jn.l.mê) Dilkuzrandin. (K) bn: şewitandin. |
| **Dilşewitîn** | (k.jn.l.mê) Dilsotin. |
| **Dilşêr** | (nl.dz) 1 mêrxas. Qehreman. Bi cerg. 2 navê kuran. |
| **Dilşikandin** | (k.jn.l.mê) Dilhêlan. Silkirin. :.Dilê wî ne şikêne. (K) bn: şikandin. |
| **Dilşikestin** | (k.jn.l.mê) Dilman. Silbûn. Kovandarî. :Heger dil şikest êdî sax nabit. (K) bn: şikestin. |
| **Dilşikestî** | (hk.l.çewa) Sil. Damayî. Bêgêwil. |
| **Dilteng** | (hn.l.çewa) Bêhinteng. Bê aram. |
| **Diltengî** | (n.l.mê) Bê aramî. Bêhintengî. |
| **Dilter** | (hn.l.çewa) Mirovê çi bi xwe nekit xem û hez ji cilêd ciwan, stiranêt xurt û keçan û bejina xwe biket.: Bapîr çendê dilte, mîna xurtekî li govendê di leyze. |
| **Diltevdan** | (k.jn.l.mê) Gêjbûn. |
| **Diltêrbûn** | (k.jn.gl.mê) Dil ji kare, mirovek yan xwarinekê têr bibit, ango êdî wî naxwazit, êdî nevêt bi bînit. Dil jê reşbûn. : Dilê min ji dinyayê têr bûye, ango ji her tiştî ez bêzar bûme. |
| **Dilxirab** | (hn.l.çewa) Kumreş. Dilpîs. |
| **Dilxirabî** | (hn.l.çewa) Dilpîsî. |
| **Dilxirabîkirin** | (k.jn.gl.mê) Dema jin yan mêr bawerî bi hevjîn yan xuşik û bara ne be, ji wî ve çavê mirovan lisere. |
| **Dilxwastin** | (k.jn.l.mê) Ji dil viyan. Hezkirin. |
| **Dilxweş** | (hn.l.çewa) Kesê çi arêş di jiyana xwe de nebin, yan xweşî ji bo xwe çê bikit..Keyfxweş |
| **Dilxweşbûn** | (k.jn.gl.mê) Kêfxweşbûn.: Bi hatina te dilê min pir xweş bû. |
| **Dilxweşî** | (n.l.mê) Kêfxweşî. |
| **Dilxweşkirin** | (k.jn.gl.mê) Mirov bi gotinan dilê yekî xweş ke. |
| | Jibîrvekirin.: Te bi wê mizgînîyê dilê xweş kir. (K) bn: kirin. |
| **Dilzar** | (nl.n.n) 1. Dilsax. 2. Navek kurdî yê kurane. |
| **Dim** | (n.x.nêr) Pişka dirêj û req bi serê çûçik û tewalanve jibo girtina xwarinê(tomik, goşt .htd). Dimê mirîşkê, kotirê, sivandokê û htd. Nikl. Dev. |

| | |
|---|---|
| **Dimbik** | (n.dar.mê) Duhol. Def. Tombilk. |
| **Dimik** | (n.dar.nêr) 1.Zêdeyîyeka dirêj û biçûk .2. Dimê çûçika 3. Dimê biçûk. |
| **Dimilî** | (zar,n.x.nêr) Zaravayê zazakî. |
| **Din** | (p.ap) Tiştê ne ew yê kû li ber teye. Dî. Ne ev yê(ya) din. |
| **Dinbilî** | (.zar,nx.nêr) Zazayî. |
| **Dindik** | (n.dar.mê) 1.Tovê fêqî yan genim , ceh .htd . : Didan wek dindikên birincî. Ango; sipî.Lib. 2. Çune. : Ez dindik di axivtina |
| | te ne gehiştim. |
| **Dindikhinar** | (n.l.mê) 1. Dindikên hinaran. 2. Navê çîrokeka zarokane, û qehremana wê ji keçeke bi heman navî. |
| **Dindil** | (hn.x.çewa) Nazik. Nazdar. Xweşdivî.: Hespê dindil. |
| **Dindilandin** | (k.jn.dar.mê) Pûte pêdaneka mezin.Nazandin.Nazdarkirin. |
| **Dindilandî** | (hk.l.çewa) Nazkirî. Sexbêrkirî. :Hespê dindilandî. Mahîna dindilandî. Zarokê dindilandî. |
| **Dinê** | (hk.cih,cugir,n.x.mê) Dinya. Cîhan. : Li sala 1970 ew hate dinê. : Malê dinê li dinê di mîne. Malê dinê qirêja destane. |
| **Dinêdîtî** | (hn.l.çewa) Mirovê dinêdîtî;ango mirovê xwedî serbor û zana. |
| **Ding** | (n.x.nêr) Dîwarê mezin û qayîm. : Dingê daye ber rêya gundî daku xirab nebit. |
| **Dinge** | (n.x.nêr) Ding. |
| **Dinya** | (hk.cih.cugr,n.x.mê) Dinê. : Dinya ya pûçe. : Dinya jibo kesê ne male. Malê dinyayê qirêja destane.: Li ser darê dinyayê min ev xanî ye heye. |
| **Dinyayî** | (hn.dar.çewa) Kar û jiyana li dinyayê di hêt kirin. Kiryarên ne jibo olî, dînî. |
| **Diqdiqandin** | (k.jn.dar.mê) Qidqidandik vekirin. Gilîzank vekirin. |
| **Diqdiqank** | (n.dar.pir) Qidqidandk. Gilîzank. |
| **Diraf** | (n.x.nêr) Bn :Dirav. |
| **Dirahî** | (n.x.mê) Direw. |
| **Diran 1** | (n.x.mê) 1. Cihê hatî dirandin. Kelaştin. 2. Direw. Vir. |
| **Diran 2** | (n.x.nêr) Didan. |
| **Dirandin** | (k.jn.x.mê) Dema mirov peroyekî di kelêşit, şeqekê di cihekî vekit. : (K) bnd; ezz di dirînim, em di dirînîn, tu di dirînî, hûn di dirînin, ew di dirûnit(....ne) ewan di dirînin.Pr: dê bi + Bdn. Bbd: min di dirand, me di dirand. Db dûr: Dirandibû,dirandibûn. (F): bi dirîne. Bi dirînin. Çîqandin. Çîqkirin. Pirtandin. Pirtkirin.: Ji kerban cilikêd xwe dirandin. |
| **Dirankirin** | (k.jn.l.mê) 1. Çêkirina diranan, didanan. 2. Leqdanan. Gestin. |
| **Diransaz** | (kar,n.dar.dz) bn Didansaz. |
| **Dirayî** | (hn.dar.çewa) Diryay. Tiştê hatî dirandin. : ….cilikên dirayî jibo karî liber xwe kirin. |
| **Dirav** | (n.x.nêr) Pare. Pend :Diravê sipî, jibo roja reş. |
| **Diravî** | (hn.dar.çewa) Tiştê têkelî bi diravî ve hebit. Raporta diravî, mijara diravî, zanîna diravî û htd. |
| **Diravname** | (n.l.mê) Raporta diravî ya rojane, mehane yan salane, dihêt berhevkirin ku mazaxtî û hatî bi hijmar têda tê xweyakirin. |

| | |
|---|---|
| **Direng** | (hk.dem) Ne zû. êvarek, salek, şevek direng.: îro ez direng ji xew rabûm. Here mala da li te nebit direng. Brx Zû. |
| **Direngeşev** | (hk.l.dem) Demhijmêrên nêzî dawîya şevê.:Direngeşev mêvanek jibo me hat. |
| **Direw** | (n.x.mê) Gotina nerast. Axivtina ne dirist. Vir. :Gotinên wî hemû direwin !. |
| **Direwîn** | (hn.dar.çewa) Kesê direwan di kit. Pend :Direwîn carek dixot firavîn.Pend :Agir berbû mala direwînî kesê bawer ne di kir. |
| **Direwkirin** | (k.jn.l.mê) Wekî kesek gotinan ji direw bi ket, çi rastîdi axivtina wî de ne bit. Virkirin. (K) bn : Kirin. |
| **Dirext** | (n.x.pir) Darûbar. |
| **Dirêj** | (hn.x.çewa) Tiştê ne kurt. Nekin. Ew jineka dirêje ; ango bejinbilind. Robarek dirêj. Darekê dirêj. Pora dirêj. Brx Kurt. |
| **Dirêjayî** | (n.dar.mê) Yekeyeke jibo pîvana tenan. :Dirêjayî ya vî robarî çende ?. Dirêjî. |
| **Dirêjbûn** | (k.jn.l.mê) Tiştek dirêj bi be. Lastîk bi kêşanê dirêj di bit. Kateya darê ya dirêj bûy. Pend :Çîrok dirêj bû, serê guhdaran gêj bû. (K) bn : Bûn. |
| **Dirêjî** | (n.dar.mê) Yekeya pîvanan. : Dirêjîya baxê me 70 metire. Dirêjîya te çende ? Brx Panî. |
| **Dirêjkirin** | (k.jn.l.mê) 1. Birakêşan yan givaştin, tişt, ten dirêj dibin. : Xwe dirêj kirin ;ango razan, raketin.2. Axivtina bê rawestan. : Çîrokê dirêj neke ; ango kurt vebire. (K) bn : Kirin. |
| **Dirêş** | (n.x.mê) Core şojine, ji hesin hatî çêkirin, sertîje, destikek darî heye, jibo kunkirina cewal û berikên qayîn, paş kunkirinê davê di kunê ra di kêşinû pê di dirûn. : Ev gonîye hinde yê qayîme, bi dirêşê jî nahêt simtin. |
| **Dirh** | (n.x.mê) Dax. Cihê qimyayî. Sotin. Dirî. |
| **Dirhan** | (n.dar.mê) 1.Diryan. Diran. 2. Direw. |
| **Dirhkirin** | (k.jn.l.mê) Dirîkirin. (K) bn : Kirin. |
| **Dirik** | (n.dar.mê) Kenarî. Dirî. Stirî. |
| **Dirinde** | (rd.dar.çewa) 1. Candarê bi kêlbe û pencan, nêçîra xwe perçe di ke. 2. Hov. Çavsor. Bewr. |
| **Dirindeyî** | (n.dar.mê) Awayê dirinde. Hovî. Çavsorî. |
| **Diringandin** | (k.jn.dar.mê) Lê xurîn. Lê heytandin.(K) bdn: ez di diringînim em di diringînîn, tu di diringînî hûn di diringînin, ew di diringîne ewan di diringînin. Pr: dê bi + bdn. Bdb : min, te,ewî, ewê(wî,wê) di diringand ; me,hewe(we), (ewan)wan, didiringandin. |
| **Dirist** | (hn.x.çewa) Kiryar, gotin, kar û htd yên bê kêmanî û rast. : Gotina te diriste.Dirist bi xwîne û binivîse. Brx Faş. Çewt. Nedirist. |
| **Diristayî** | (hn.dr.çewa) Bi rastî. Bê çewtî.: Ez bi diristayî tênegehiştim mebestan te çîye?. |
| **Diristbûn** | (k.jn.l.mê) Rastbûn. Petbûn. Hatin ser rêya dirist. Çêbûn. |
| **Diristî** | (hn.dar.çewa) Diristayî. : Navê xwe bi diristî bêje. |
| **Diristkirin** | (k.jn.l.mê) Çêkirin. Peytkirin. Rê şanî dan. Ji şaşîyan vavartin. Berhevkirin. Amadekirin. (K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Dirî 1** | (n.x.mê) giya1.Giya û tiraşeka bi stirîye, belgêt wê di kesik û xemildarin, berê wê mîna tûyane, şirîn çêjdarin, rengê wan direşin, berî gehiştinê di kesik û sorin.2. Dehil. |
| **Dirî 2** | (n.x.nêr) Nîşaneke, nemaze xwedîyê kewalan, bizin û pezên xwe ji yên din pê di nasin, dema bi daxkirin yan birînê liser guhên wan di ken. |
| **Dirîdan** | (k.jn.l.mê) 1. Xwînberdan ji guhan. Dirîkirin. 2.Tankirina bax û rezan bi dirîyan. Perjanê bi dirîyan hatî kirin. |
| **Dirîn** | (k.jn.x.mê) 1. Jêkirin. Çinîn. Birîn . 2. Pêkvegirêdan a cilkan..Dirûtin.: Tu cilan kerke, ez dê dirîm. Dema dirîna cehane. |
| **Dirkandin** | (k.jn.dar.mê) Aşkerakirin. Ji holê derxistin. Berçavkirin. Ragehandin. |
| **Dirke** | (n.x.mê) Zibil ê çûçikan. Zîç. Zîq. |
| **Dirîne** | (nax.mê) Çinîn. |
| **Diro** | (n.x.mê) Direw. Vir. Neweyî. |
| **Dirov** | (n.x.mê) Dirûv. |
| **Dirûd** | (n.x.mê) Silavêd pîroz. Silavêd pêxember û çakan. Silav. |
| **Dirûn** | (k.jn.x.mê) Dirîna genim, ceh, nîsk û htd li zevîyan Dirûna cilikan. |
| **Dirûne** | (n.dar.mê) Karê dirûtina zevîyan,genim, ceh, birinc, nîsk û htd. : Meha bihêt dema dirûne ya genimî ye. |
| **Dirûnekirin** | (k.jn.l.mê) Dema pale zevîyan di dirûn. : Salekê me dirûna genim di kir, baranek mezin barî.(K) :Kirin. |
| **Dirûngeh** | (n.dar.mê) Zevî yan cihê dirûnê. |
| **Dirûnkar** | (pîşn.dar.dz) Pale û cotkarên dirûnê di kin. |
| **Dirûnkarî** | (karn.dar.mê) Karê dirûna dexil û giyayî. |
| **Dirust** | (hn.x.çewa) Dirist. |
| **Dirûş** | (n.x.nêr) Binê pêy. |
| **Dirûşim** | (n.dar.mê) 1. Rû. Rûmet. 2. Parole. 3. Rewş. |
| **Dirûtin** | (k.jn.x.mê) Dirûn. |
| **Dirûv** | (n.x.mê) 1. Perçe kaxez, yan peroyeke bihayê mitayî liser dinivîsin jibo firotinê.2. Rû. Rûmet. Serûçav. |
| **Dirûvandin** | (k.jn.dar.mê) Fêwe diriskirin.Guherandina şêweyê tenan. (K) bdn : ez di dirûvînim, em di dirûvînîn. Tu di dirûvînî, hûn di dirûvînin. Ew di dirûvîne[...it], ewan di dirûvînin. Pr : Dê bi + bdn. Bdb : di dirûvand, di dirûvandin. Db,dûr : Dirûvandibû, ... bûn. (F) : bi dirûvîne, bi dirûvînin. |
| **Dirûvdan** | (k.jn.l.mê) Çêkirin. Peydakirin. Avirandin. (K) bn : Dan. |
| **Dirwêne** | (n.x.mê) Dirûne. |
| **Disan** | (pêrb) rêzman Alavê dubarekirinê ye.Dîsa. Dîsa. Carek din. Careka dî. |
| **Dismal** | (n.dar.mê) Destmal. Desmal. Kefîk. |
| **Distar** | (n.x.nêr) 1. Du berên pan û zivir liser hev di zivrînin, jibo hêrana danî.Aşkê destî. 2.Hêmaya xebat û berxwedanê. |
| **Distarhêr** | (karn.dar.dz) Mirovê distarî di hêre. |
| **Distarhêran** | (k.jn.l.mê) Karê distarî. Hêrana danî bi distarî. (K) bn : Hêran. |
| **Distarhêrk** | (n.dar.mê) Dema hêranan distarî, nemaze şeva ko dê li malekê danî bi hêrin. : îşev li mala bapîrî distarhêrke. |

| | |
|---|---|
| **Diş** | (n.x.mê) Xûşka jinê. : Dişa wî ye û jinbira wîye ,ango ; Xweha jina wî jina birayê wî ye. |
| **Divêle** | (n.x.mê) Bendikên ji çerim yan lastîkê hatîne çêkirin. |
| **Diwa** | (n.x.mê) Dawî. Domahîk. |
| **Diwazde** | (hijn.çend) Hejmara 12. 6+6= 12. |
| **Diwazdeh** | (hijn.çend) Diwazde. |
| **Diwazdehmîn** | (hijn.çend) Ya/yê/yêd diwazdê. |
| **Diwazdehizar** | (hijn.l) 12,000. |
| **Diwazdemilyon** | (hijn.l) 12,000,000. |
| **Diwêl** | (n.x.mê) Divêle. |
| **Dixtor** | (pîşn.x.dz) Kesê nexweşan çare di ket. Nojdar. Pizîşk.Diktor. |
| **Dixtorî** | (karn.x.mê) Nojdarî. |
| **Diyar** | (hn.x.çewa) 1.Aşkera. Xuya. Berçav.. 2.Navê mêrane. |
| **Diyarbûn** | (k.jn.l.mê) Xuyabûn. Aşkerabûn. Avhilbûn.: Eve tu li kîve yî diyar bibe!. (K) bn: Bûn. |
| **Diyarî** | (n.dar.mê) Xelat. |
| **Diyarîdan** | (k.jn.l.mê) Diyarî pêşkêşkirin. Diyarî parvekirin. :Evro mamosta diyarê dan qutabîyan. (K) bn: Dan. |
| **Diyarkirin** | (k.jn.l.mê) Xuyakirin. Aşkirakirin. (K) bn: Kirin. |
| **Diz** | (karn.x.dz) Kesê malê xelkî bi rêya ne rewa ji xwere di be. Dizîker. Pend :Dizê bi bilûr.ango mirovê dixaze karekî bi dizî ve bi ke, lê ji nezanîna wî kar aşkera di be. Cerde.Pend:Dizî(dizîker) ji dizî(dizîker) kir dizî(dizîn), erd û esman lerizî. . Pend :Diz û maxweyê malê bûn heval.ga di kulekê ra dizîn. |
| **Dizdî** | (n.x.mê) Dizî. |
| **Dizî** | (n.x.mê) Karê ko mirov malê xelkî bi dizî ve di stîne. |
| **Dizîker** | (karn.l.dz) Kesê pîşe yan karê wî dizîye . Diz. |
| **Dizîkirin** | (k.jmê) Dema yek tiştekî bi dizit. (K) bn: Kirin. |
| **Dizîn** | (k.jn.x.mê) Dizîkirin (K) bdn:z di dizim, em di dizîn, tu di dizî hûn di dizin. Ew di dize[…it] ewan di dizin. Pr: Dê bi dizim,..n,,. Bdb : di dizî, di dizîn. Db,dûr :Dizîbû, …bûn. (F) :Bi dize, bi dizin. |
| **Dizok** | (kar,n.dar.dz) Diz. Dizîker. |
| **Dî** | (pêrb) rêzman Alavê hevberkirinê.Eve ne, ya dî, yê dî, yên dî. Rojeka dî. Careka dî. Saleka dî. Demek dî. Din. |
| **Dîbace** | (n.x.mê) Pêşgotin. |
| **Dîcle** | (cugirn.x.nêr) Yek ji mezintirîn çem ên Kurdistanê. |
| **Dîdar** | (n.dar.mê) Dîtin. Hevdîtin. Hevpeyvîn. |
| **Dîde** | (n.x.mê) Dîdar. Dîtin. |
| **Dîdevan** | (karn.dar.dz) Kesê ko tişt yan bûyer bi çvên xwe dîye.Zêrevan. Nêrevan. |
| **Dîdvan** | (karn.dar.dz) Dîdevna. |
| **Dîk** | (n.x.nêr) Dîkil. |
| **Dîkêl** | (n.x.mê) Kadî. Dûkel. :Dîkêla kuçkî. Dîkêla cigarê. |
| **Dîkêlkirin** | (k.jn.l.mê) Peydabûna dîkêlê. :Sope dîkêlê di ket. |
| **Dîkil** | (n.x.nêr) Tewalek malîye, nêrînê mirîşkane. Kirosk.Kelebang. |

| | |
|---|---|
| **Dîkilok** | (n.dar.mê) Stêrka tivengê. |
| **Dîkor** | (n.biyan.x.nê) Mal , jor , xanî. htd. Xemlandî. |
| **Dîkorkirin** | (k.jn.l.mê) Xemlandin. |
| **Dîksilêman** | (n.l.nêr) balinde Teyrikê Silêman pêxember. Teyrikê dunikil. |
| **Dîktator** | (hnbiyan.çewa) Diktator. |
| **Dîktatorî** | (n.biyan.dar.mê) Diktatorî. |
| **Dîl** | (hn.x.çewa) Kesê di kevit destê neyaran .Girtî.zîndanî. Ne azad. Bend. |
| **Dîlan** | (n.x.mê) 1.Keyf. Xweşî. 2.Govend. Fahî(Fayî).3. Navê keçane. |
| **Dîlankirin** | (k.jn.l.mê) Govendkirin. Fayîkirin. Kêfkirin. : Werin dîlanê bi kin evro roja meye. (K) bn: Kirin. |
| **Dîlawer** | (hn.dar.çewa) Dilawer. |
| **Dîlbaz** | (hn.dar.çewa) Xweşik. Balkêş. Ciwan. Rind. |
| **Dîlî** | (hn.dar.çewa) Girtî. Bendî. Pxsîrî. Rebenî. : Ew bi dîlî kevte destê dujmin. |
| **Dîlokvan** | (karn.dar.dz) Serkêşê desteya dengbêjan ko li dîlanê di stirin. |
| **Dîmen** | (n.x.mê) Cihê jibo dîtina çavan balkêş û bi xemil.: Dîmenê çiyayê han pir ciwane. |
| **Dîn 1** | (hn.x.çewa) Kesê ji alîyê mejî ve kêmasî hebin. Fêt. Aqilsivik. |
| **Dîn 2** | (n.x.nêr) Bawerî. Ol. Dinê îslamê, Felan û htd. |
| **Dînamîk** | (hn.biyan) Bi bizav.Livîn. Çeleng. |
| **Dînamîkî** | (n.biyan) Tiştê berdewam di livîn û guhorînê da. |
| **Dînamo** | (n.biyan) Dînemo; Amêreke di zivirit, têhna karebê jê peyda di bit. |
| **Dînar** | (n.x.mê) Parê welatê îraqê û hindekên din. |
| **Dînbûn** | (k.jn.l.mê) Dema aqilê kesekî sivik dibe. Ji tirsan dîn bû. (K) bn: Bûn. |
| **Dîndar 1** | (hn.dar.çewa) Kesê pêgirî beramber dînî hebit. Mirovê xudanas. Xwedênas. Olperês. |
| **Dîndar 2** | (n.dar.mê) Dareke li çiyayên Kurdistanê hişîn di bit. |
| **Dîndarî** | (n.dar.mê) Kar û xebata jibo dînî dihêt kirin. Olperistin. |
| **Dînemêr** | (hk.l.çewa) Mêrxas. Mêrçak. Çavnetirs.: .... Dîne mêre her nizanit mirin heye yan ne. |
| **Dînemêrî** | (n.l.mê) Mêrçakî. : Dînemêrî ya wî bo her kesî xuyaye. |
| **Dînê** | (nhd.dar.mê) Gazîkirin û naznavê jina dîn. |
| **Dîng** | (n.x.nêr) Kilka pezî ya qelew û bi bez.: Dîngê mihê, beranî, berxê. |
| **Dînik** | (hn.dar.çewa) Mirovê kêmaqil. Piçek dîn. Nîvdîn. Sade. |
| **Dînî 1** | (rd.dar.çewa) Karên têkelî bi dînî ve hebin. Olî. : Bizava dînî, gotara dînî, partîyên dînî,û htd. |
| **Dînî 2** | (n.dar.mê) Kiryarên mîna dînan. Dînatî. : Te bo xwe bi dînî yê bire ser. |
| **Dînîtî** | (n.dar.mê) Dînî. Dînatî. |
| **Dînk** | (n.x.mê) Cihekê kizir û bijîne alîkê lê di danin û pez û bizinî ber di din ser dako bi çerin. Dardînk. |
| **Dînkirin** | (k.jn.l.mê) Weke mirov jiber tirs, kutekî yan her sedemeka dî dîn bi be yan mejî wî têk bi de. . :Dengê firokan zarokêd me dînkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Dîno** | (ngaz.dar.nêr) Bangkirin û naznavê peyayê dîn.Zelamê dîn. |

| | |
|---|---|
| **Dînozor** | (n.cîhan) Candarek mezine, ji mêje jinav çûye. Daynesor. |
| **Dînperist** | (hn.l.çewa) Dîndar. |
| **Dînperistî** | (n.l.mê) Dîndarî. |
| **Dînsist** | (hk.l.çewa) Mirovê pêgirîya wî bi dînî kêm be.Kesê sistîyê di erkê dîn da di ke. |
| **Dînxane** | (n.dar.mê) Cihê çavdêrîya dînan. |
| **Dîq** | (n.x.mê) derd Nexweşîya sihan. Pşa zirav. Sile. |
| **Dîpişk** | (n.dar.nêr) adî Giyandarekê adîye , xişoke, jehirdare. Dûpişk. |
| **Dîr** | (hn.dem,cih) 1.Tiştê dîr(dûr) yê ko delîve navbera wî û yê dî da hebit. Dûr. |
| **Dîratî** | (n.pîvan,dar.mê) Delîve. Cihê dîr.Direjî. : Dîratîya navbera Duhok û zaxo nêzî 50 kme. Dûrî. |
| **Dîrbûn** | (k.jn.l.mê) Dûrbûn. |
| **Dîrî** | (n.pîvan.dar.mê) Dîratî. |
| **Dîrkevtin** | (k.jn.l.mê) Dûrkevtin. |
| **Dîrkirin** | (k.jn.l.mê) Dûrkirin. |
| **Dîrkuj** | (hk.l.çewa) Tişt yan mirovê ji dîrve ciwan . Ji dûr xuşkûk. |
| **Dîrok** | (n.dar.mê) Zanîna nivîsîn û tomarkirina bûyerên demên kevin yên netewe, welatan. |
| **Dîrokî** | (hn.dar.çewa) Bûyerên têkelî bi dîrokê ve hehe. : Waneyêd dîrokî, Dîvçûnên dîrokî û htd. |
| **Dîroknivîs** | (karn.l.dz) Kesê pispor di warê nivîsîna dîrokê da. |
| **Dîrokvan** | (karn.dar.dz) Dîroknivîs. |
| **Dîrokzan** | (karn.dar.dz) Dîrokvan. |
| **Dîsa** | (pêrb) rêzman Alavê duca û çendcarkirinê. Tiştê, bûyera dubare di bit. Carek din. :Dîsa te we got. Ango;berî nuke jî gotîye. |
| **Dîsan** | (pêrb) Dîsa. |
| **Dîsanekê** | (pêrb.dar) Dîsa. |
| **Dîsk** | (n.x.mê) 1.Du darikin bi destikê bagurdanî ve, di kevin herdu çalikên bagurdanî. 2. Dîska Kompyoterî. |
| **Dîtbar** | (hn.dar.çewa) Berçav. Xuya. Mirov dikare bibîne. |
| **Dîtin** | (k.jn.l.mê) 1.Dema candar bi çavan di bînin. Pend :Dîtina çavan direwe.2. Boçûn. Nêrîn. :Bi dîtina min eve krekê çake.(K) Bdn: ez di bînim, em di bînîn. Tu di bînî, hûn di bînin. Ew di bîne[..it] ewan di bînin. PR: Dê[bi] + bdn. Bdb: di dît, di dîtin. Db,dûr: Dîtibû, ….bûn. (F): Bi bîne, bi bînin. |
| **Dîtir** | (pêrb) rêzman Alavê jêgirtinê.Ya dî ne ya dîtir. Eve ne, lê ya dîtir. Dî. Din. |
| **Dîv** | (n.x.mê) 1.Kilka giyandaran. Dûv. 2. Paş.:Ez dê çim tu li dîv min were. |
| **Dîvçûn** | (k.jn.l.mê) Pisyar û lêgerana tiştan , bûyeran ta mirov digehit dawîyekê. Vekolîn . Lêgeran.Lêkolîn.(K) bn: Çûn. |
| **Dîvçûnkirin** | (k.jn.gl.mê) Dîvçûn. :Min dîçûna wê bûyerê kir, lê hêjta ne zelale.(K) bn:Kirin. |
| **Dîvdîvk** | (n.l.dz) 1. Tişt yan kesê herdem bi dîv mirovî yan tiştî ve. 2.Texteke yan çepereke di êxin dîv cencerê jibo hulîkirina qeselê(kayê). |

| | |
|---|---|
| **Dîvelank** | (pin.dar.dz) Kesê bi dîv dujminê gel, mal , refa xwe bi kevit. Xwefiroş. Kirêgirtî. |
| **Dîw** | (n.x.mê) giya; Silk. |
| **Dîwan** | (n.x.mê) 1.Koçika pir ji mêvanan.:Dîwana axay ya germe, ang; tijîye ji mirovan. 2. Pertoka hozanan. Dîwana melayê cizîrî.3. Bireka mirovan bi hevre.4. Kenepe. Qenepe. |
| **Dîwanxane** | (n.dar.mê) Koçika mêvanan. |
| **Dîwar** | (n.x.nêr) Doşkeke ji beran yan, libnêt axê yan çîmentoyê dihêt ranan jibo avahîyan. Forhe :Dîwarê xanî. :Çar dîwarên girtîgehê. Pend :Dîwarê liser befirê.ang; gotin û kiryara sist û bê.bingeh. |
| **Dîwardanan** | (k.jn.l.mê) Dana dîwaran. Avakirina dîwaran. (K) bn: Danan. |
| **Dîwarkirin** | (k.jn.l.mê) Diristkirina dîwaran. Avakirina dîwarên xanîyan. Nijinîn. : Me hewşa xwe jiber kewal û candarên din dîwarkir.Dîwargirêdan. (K) bn: Kirin. |
| **Dîyar** | (hn.x.çewa) 1 Tiştê berçav, yê di bînî. Xuya.Diyar. 2 Navê kurane. |
| **Dîyarbûn** | (k.jmê) xuyabûn .bn :Bûn. |
| **Dîyarî** | (n.x.mê) 1. Xelatê pêşkêşî kesekî bikey. 2. Navekê duzayende. |
| **Dîyarkirin** | (k.jmê) Xuyakirin. (K) bn: Kirin. |
| **Dîz** | (n.x.mê) Amanê tê lênana xwarinê. Qazan. Çîroka zarokan :Kêza terecan kete dîza pan. Neman sitî û xan. Pend :Du ser di dîzekê da na kelin.ang ;heger du semyan yan du rêber hebin dê alozî peyda bin.Pend :Dîza kabanîyê şikênandî, deng jê nahêt. |
| **Dobe 1** | (n.x.mê) 1.Hingvînê zelal yê ji şaneyan cuda di bit. Dilopeke şirînîya zer ji hijîran di hêt xwar. |
| **Dobe 2** | (n.x.mê) Kelek. Daverist. |
| **Dojeh** | (n.x.mê) Cihê agirê sizadana mirovên xûdê nenas û gunehkaran. Agir. Cehnem. BR x Beheşt. |
| **Dol** | (n.x.mê) Newal. Nihal. |
| **Dolik** | (n.dar.nêr) Amaneke ji like, asin yan şûşe hatîye çêkirin, avavexwarinê tê di ken. Nihalk. |
| **Dolar** | (n,biyan.x) Pareyê hinek welatane, xasim Emrîka. Dolar. $. |
| **Dolîdank** | (n.dar.mê) Hêzik. Hêsk. Colandik. |
| **Domîne** | (n.biyan) Amêreke pê di lîzin, domînê pê di kin. |
| **Domînekirin** | (k.jn.l.mê) Lîstika domînê di hêt kirin.Bi domînê lîstin. (K) bn: Kirin. |
| **Don** | (n.dar.nêr) Çevir. Rûn. Nîvişk. Bez. Pend :Donê wî di serê wî da. Ango; dema mirov şîretekê yan diyarîkê bi de yekî her ji ked û malê wî be. |
| **Dongirtin** | (k.jn.l.mê) Qelewbûn. Bezgirtin. |
| **Donzde** | (hijn.çend) Diwazde. 12. |
| **Doq** | (n.x.nêr) 1. Dar. Çîv. 2. Sîvok. |
| **Dor** | (n.x.mê) Ger. Hel. : Dora kîye, dora mine. Bi dore, ne bi zore. |
| **Dorandin** | (k.jn.dar.mê) Belavkirin. Parvekirin. |
| **Dorgirtin** | (k.jn.l.mê) Abloqedan. Dorpêçan. |
| **Dorgirtî** | (hn.dar.çewa) Abloqedayî. |
| **Dorhêl** | (n.dar.mê) Dewrûber. Kawdan. Rewş. |

| | |
|---|---|
| **Dormandor** | (n.dar.mê) Hemû alî. Dorpêç. Rexûçan. |
| **Dorpêç** | (n.dar.mê) Abloqe. |
| **Dorpêçan** | (k.jn.l.mê) Dorgirtin.(K) bn:Pêçan. |
| **Doskî** | (malbn.x) 1. Hozeka kurdane li Kurdistana Iraq,Turkya û Iranê. 2. Kesê ji hoza doskî. |
| **Dost** | (n.x.dz) Heval. Birader. Hevrê. Pend :Dujminê zana çêtire ji dostê nezan. Pend :Dinya di bit bihost, dujmin nabit dost. |
| **Dostane** | (hn.dar.çewa) Kiryarêd hevalîlî. : Yarîya dostane. |
| **Dostanî** | (n.dar.mê) Dostînî. |
| **Dostikî** | (malb,n.x) Doskî. |
| **Dostînî** | (n.dar.mê) Hehalînî. |
| **Doşandin** | (k.jn.x.mê) Dotin. şîr yan ava fêqî dotin. Bi doşîne. Bi doşe. |
| **Doşav** | (n.l.mê) Ava şirîna ji tirî û fêqîyên dî tê çê kirin. |
| **Doşek** | (n.x.mê) nivîn Perokek stûre mirov li ser di raze dema xew û pêhinvedanê. Lalîk. |
| **Doşîn** | (k.jn.x.mê) Givaştina her tiştekî tanî şilîyek jê bi hêt. :Çêl doşîn. Pez doşîn. Pend :Ez di bêjim nêre, ew di bêjî bi doşe. (K) : bdn : ez di doşim em di doşîn, tu di doşî hûn di doşin, ew didoşe[…it] ewan di doşin. Pr : dê[bi] + bdn. Bdb : di doşt, didoştin. Db,dûr : doştibû. ….bûn. (F) : bi doşeş bi doşin. |
| **Doştin** | (k.jn.x.mê) Doşîn. Dotin. |
| **Dot** | (n.x.mê) Nivşê mê yê daybaban. Keç. Kiç. Dota mamê. Dota xalê, Dota bira, htd. |
| **Dotin** | (k.jn.x.mê) Doşîn. Pend :Çêl dotin û kezwan kelotin. Ang; kirina du karên ji hev dûr. |
| **Dotir** | (pêrb) Dîtir. |
| **Dotmam** | (hn.l.n.mê) Keça mamê. |
| **Dox** | (n.x.mê) Bar. Rewş. |
| **Doxîn** | (n.x.mê) Bendikeke di şel yan şelwalî ra derbaz di kin jibotundkirinê. |
| **Doxînsist** | (hn.l.çewa) Mirovê doxîna wî sist be. şelwalsist. Mirovêbêserûber. Mirovê xav. |
| **Doxînşil** | (hn.l.çewa) Doxînsist. |
| **Doz** | (n.x.mê) 1.Kê,. 2.Daxaz. 3. Armanc.4.Rêç.Doza gelê kurd. |
| **Dozkar** | (n.l.dz) Kesê daxwazekê yan gazindekê pêşkêşî alîyêd havildar di ke, mîna dadgehê. Daxwazker. |
| **Dozkirin** | (k.jn.l.mê) Daxwazkirin. Sikalakirin. (K) bn : Kirin. |
| **Du** | (hijn.çend) Hijmara 2. 1+1=2. |
| **Dubare** | (hk.ducakirin) Wekî karek yan bûyerek careka dî rû di det.Careka dî. Carek din. : Ev filme dubare ye. |
| **Dubarrebûn** | (k.jn.gl.mê) Dema karek yan bûyerek dubare di bit. : Gotina hatî kirin dubare na bit. (K) bn : Bûn. |
| **Dubarekirin** | (k.jn.gl.mê) Kar û kiryar carek dî di hêt kirin.: Tu dikarî gotina xwe dubare bikî?. Bapîrê min di got çi caran axivtina xwe dubare ne ke. (K) bn: Kirin. |
| **Dubarekirî** | (hk.l.çewa) Karê hatî dubare kirin. :Bernameya dubarekirî. |

| | |
|---|---|
| **Dubend** | (hk.l.çewa) Duta. Duser. Hevgirtin. |
| **Dubendî** | (n.l.mê) Hevnegirtin. Berelayî. Bêserî. Yeknegirtin. |
| **Duber** | (hk.l.çewa) 1. Peroyêd du ber hebin. 2. Candarên salê du car di zên. : Pezên duber. 3. Dar yan giyayêt salê ducar berî di din. : Hijîra duber. |
| **Dubrank** | (n.dar.nêr) balinde Teyrê nêçîrê. Baz. |
| **Duca** | (hkducakirin) Du kar bi hên kirin. Dubare.: Ez duca çûme derveya welatî. :Xanîyê wî duca ji yê min mezintire. du ca du dibit çar. |
| **ducabûn** | (k.jn.gl.mê) Dubarebûn. |
| **Ducakirin** | (k.jn.gl.mê) Dubarekirin. (K) bn: Kirin. |
| **Ducan** | (rd.l.çewa) Jina giran yan candara avis. |
| **Ducar** | bn: duca. |
| **Ducarbûn** | (k.jn.gl.mê) Dubarebûn. |
| **Ducarkirin** | (k.jn.gl.mê) Dubarekirin. (K) bn: Kirin. |
| **Duçar** | (n.dar.mê) Serpêhatîyên nexweş.Çam. Derd. Karesat. |
| **Duçarbûn** | (k.jn.gl.mê) Rastî derd û çaman hatin. Toşbûn. Têkevtin.(K) bn:Bûn. |
| **Duçarkirin** | (k.jn.gl.mê) Toşkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Ducarkî** | (hn.l) Duca kar di hê kirin. |
| **Duçeng** | (hk.l.çewa) Du şaper, du dest.1. rêzman. Pîtên du deng hene, mina P, Ç,L û htd. Dudeng.2. Du alî. |
| **Duçerx** | (hk.l.çewa) 1.Duta. Du xirxalî. 2. Paysikil. Kerkê asinî. |
| **Dudil** | (hk.l.çewa) Mirovê di kevit navbera du karan û nizane çi bi bijêre. :Ezê du dilim nizanim bi çim nik wî yan ne !.Gomandar. |
| **dudilî** | (n.l.mê) Mirov ji gotin yan kiryara xwe ne piştraste. Nepiştrastî. :Jiber dudilîya xwe ew herdem ya aloze. |
| **Dudu** | (hijn.çend) Hijmara du. 2. 1+1=2. |
| **Duduyan** | (hk.hevberkir.hij) Ya/yê/yêd duwê. |
| **Dugihan** | (h.dar.çewa) Ducan. Avis. |
| **Duguh** | (n.l.mê) Milhêba bi du guhan. |
| **Duh** | (hk.dem) Roja çûyî. Roja bihorî.Duhî. :Duh baran di barî. |
| **Duhem** | (hk.hevberkir,hij) Ya / Yê / Yên duwê. |
| **Duhizar** | (hk.hij,n) Hijmara 2000,. |
| **Duhin** | (n.x.nêr) Rûn. |
| **duhî** | (hk.dem) Duh. |
| **Duhok** | (hk.cih,Cugrafn) Bajareke li bakûrê Kurdistana Iraqê, devea Badînan. |
| **Duhokî** | (malbn) Xeilk yan kesê ji bajarê Duhokê. |
| **Duhol** | (n.l.mê) mûzîk Amêrekê mûzîkêye du alî hene bi, darî şiveka zirav.lê di din. Li şahîyan di gel awazên zirnayê lê dixin. |
| **Dujmin** | (n.dar.dz) Neyer. Xwîndar. :Nezanîn dujmine. |
| **Dujminayî** | (n.dar.mê) Dujminahî. Neyarî. Xwîdarî. |
| **Dujminkarî** | (n.l.mê) Dujminahî. |
| **Dumahî** | (n.x.mê) Senta dawîya her tiştî. : Dumahîya rojê; ang êvar. Dumahîya heyvê, salê.Kutayî. |

| | |
|---|---|
| **Dumahîhatin** | (k.jn.l.mê) Kutahatin. Dawîhatin. :Karê me bi dumahî hat. |
| **Dumahîk** | (n.dar.mê) Dumahî. |
| **Dumarekol** | (n.l.nêr) Dûpişk. |
| **Dumbelan** | (n.x.mê) Coreke hişîkatî ye, reng boze û girovire mîna kivarkane. |
| **Dumilyon** | (hijn.l.çend) Hijmara 2,000000,. |
| **Dundan** | (k.jn.l.mê) Dema tiştek candarek yan xwarinek bi dunî bi hêt tamdan.Zeytkirin. : Wî tivenga xwe dun di da. Pişta hespî dun dan. (K) bn: Dan. |
| **Dundayî** | (hk.l.çewa) Hatî dun dan. : Dorika dundayî;ango nanê dundayî. |
| **Dundul** | (hn.dar.çewa) Dindil. |
| **Dundulandin** | (k.jn.dar.mê) Nazkirin. Nszandin. Dindilandin. |
| **Dupişk** | (hk.l.çewa) Ji du pişkan pêk hatî ye.Dubeş. Dubar. |
| **Dupişt** | (hk.l.çewa) Duber. Duser. Durex. Du alî. |
| **Dupoçik** | (n.dar.nêr) Dûpişk. |
| **Duqat** | (hk.hevberkirin.çewa) Duca. Ducarkî. Duberamber. : Bihayê cilikan bûye duqat. |
| **Dur** | (n.x.mê) Core berekê ciwan û bi bihaye jibo nexşkirina gostîl û ristikan bikar dihêt. Mirarî. |
| **Dureh** | (hk.l.çewa) Duryan. |
| **Durehkirin** | (k.jn.l.mê) Çêkirina du rêyan, du liqa, du coya û htd. (K) bn : Kirin. |
| **Durî** | (n.x.nêr) Nîşaneke xasime kewaldar bi kêrê yan daxkirinê liser guhên bizin û mihan di ken dako ji yên din bi hên cudakirin, ango her malekê durî yê xwe heye. Dax. Nî,an. |
| **Durîn** | (k.jn.x.mê) 1. Çinîn.2.[cilik] Peytkirin. : Zevî durîn. (K) bdn:ez di durîm, em di durîn, tu di durî, hûn di durîn, ew didurît, ewan di durîn. PR: Dê[bi] + bdn. Bdb: di durî, di durîn. Db,dûr : Durîbû, …bûn. (F) : bi durî, bi durin. |
| **Durîne** | (n.dar.mê) Durîna danî. : Dema durîna genim û ceh. |
| **Durust** | (hn.x.çewa) Dirist. |
| **Durû** | (hk.l.çewa) Mirovê li her cihekî bi rengekî serederîyê di ke, û hez ji têkvedanê bi ke. Ang ; li cem te hevale û li pişt te dujmin. : Bawerîya xwe bi wî ne hîne, ew mirovekê durû ye. |
| **Durûtî** | (n.dar.mê) Dema mirov karê [durû] bi ke. |
| **Durûv** | (n.dar.mê) Dirûv. |
| **Durzîle** | (n.dar.mê) giya Gezînk. |
| **Dused** | (hijn.l.çend) Hijmara 200. |
| **Dusibe** | (hk.dem) Roja li paş sube. Piştî sube. |
| **Dustar** | (n.x.nêr) Distar. |
| **Duşaxe** | (n.dar.mê) Nexweşî, êşa diftêrya. |
| **Duşem** | (b) ( hk.dem) Roja di keve navbera êkşemb û sêşembê. |
| **Duta** | (hk.l.çewa) Du rex. Du alî. Du dav.Du kit. |
| **Dutabûn** | (k.jnl.mê) Dema tiştek di be duta. |
| **Dutakirin** | (k.jn.l.mê) Mirov davek yan tiştekî bikete du ta. Cotkirin. |
| **Duvkî** | (hk.dem) Di dûv re. Paşî. Bêhneka din. |

| | |
|---|---|
| **Duwa** | (hk.x.çewa) Ya dumahîkê.Dawî. |
| **Duwazde** | [h] (hijn.çend) Hijmara 12. |
| **Duwazdehizar** | (hijn.l) Hijmara 12,000. |
| **Duwazdemilyon** | (hijn.l) Hijmara 12,000,000. |
| **Duwem** | (hijn.çend) Ya/yê/ yên duwê. |
| **Duwê** | (hijn. çend) Duwem. Cara, roja, sala duwê. |
| **Duwêl** | (n.x.mê) Divêle. |
| **Duzerik** | (hk.l.çewa) Hêk [hêlik] a du zerik têda bin. |
| **Duzil** | (n.l.mê) mûzîk,Dudik. |
| **Duzîn** | (hk.l.çewa) Dewar, [nemaze] hespê çar salî. |
| **Dû** | (hn.hij.n.x) 1. Hijmara 2. 1+1= 2. 2. Dûv. Kilk. Kurî. 3. Paş. Dûv re.4. Dûkêl. Kadî. Dûman. |
| **Dûbare** | (hk.ducakirin) Dubare. |
| **Dûblaj** | (n.biyan) Dengê liser filman hatî danan. |
| **Dûblajkirin** | (k.jn.l.mê) Deng xistine ser filman ku digel livînê bit. |
| **Dûbrang** | (n.dar.nêr) Teyrê nêçîrê. |
| **Dûçar** | (n.dar.mê) Duçar. Dûçar- bûn, …kirin. |
| **Dûçûn** | (k.jn.l.mê) Li dîvçûn. Lêgerîn.Vekolîn. |
| **Dûde** | (hk.dem) Dûra. Paşî. |
| **Dûdeman** | (k.jn.l.mê) Berdewam li dûv çûn. |
| **Dûdik** | (n.dar.mê) Dudik. |
| **Dûg** | (n.x.nêr) Dwîng. Kilk. |
| **Dûkan** | (n.dar.mê) Dikan.Dukan. |
| **Dûkevtin** | (k.jn.l.mê) Weke mirov bi keve dû kesek yan karekî. Peykevtin. (K) bn: Kevtin. |
| **Dûkêl** | (n.x.mê) Kadî. |
| **Dûkirin** | (k.jn.l.mê) Kadîkirin. :Kuçik dû di ke. |
| **Dûmahîk** | (n.dar.mê) Dawî. Dumahîk. |
| **Dûman** | (n.x.mê) Dûkêl. Kadî. Mij. |
| **Dûmeqesk** | (kn.l.mê) balinde Çûçika kurî meqesk. Hacîreşk. |
| **Dûn** | (n.x.mê) Bez. Rûn. Nîvişk. |
| **Dûndan** | (k.jn.l.mê) Dundan. |
| **Dûng** | (n.x.nêr) Dîng. Kilk. Kurî. |
| **Dûngirtin** | (k.jn.lmê) 1. Nîvişk ji ji mastî cuda kirin.2. Qelewbûn. Bezgirtin. |
| **Dûpişk** | (n.l.nêr) Dupişk. |
| **Dûr** | (hk.x.pîvan,çewa) Tiştê ne nêz. Ne nêzîk. : Gundê me ji bajêrî gelek dûr e. |
| **Dûra** | (hk.dem) Paşî.Dûr ra-re. |
| **Dûrahî** | (npîvan.dar.mê) Dûrî. |
| **Dûratî** | (npîvan.dar.mê) Dûrî. |
| **Dûrayî** | (pîvann.dar.mê) Dûratî. |
| **Dûrbîn 1** | (n.l.mê) Dêrbîne. |
| **Dûrbîn 2** | (hk.l.çewa) Kesê bêhinfireh û pispor ko li paşerojê dinêrit. |

| | |
|---|---|
| **Dûrbûn** | (k.jn.l.mê) Dema tişt, mirov dûr di bin li ber çavan. |
| **Dûre** | (hk.dem) Dûra. |
| **Dûrêxistin** | (k.jn.l.mê) Dûrxistin. |
| **Dûrgeh** | (n.dar.mê) 1. Girav. 2. Girik. Mil. |
| **Dûrhêl** | (n.dar.mê) Tîştê, kiryara berçav û rastî.riyalistî. |
| **Dûrik** | (n.dar.mê) 1. Nanê sêlê yê gerim û piçek ji nanê tenik stûr tire. Dûrika dûnî. Dûrika mirîyan ; ango nanê bi xêra mirîyan didin. : …. du dûrik bi çayê xwarin. |
| **Dûrî** | (n.dar.mê) Pîvana delîveya navbera du alîyan. tiştê dûr. BRx nêzîkî. |
| **Dûrkevtin** | (k.jn.l.mê) Mezinbûn yan firehbûna delîve di navbera tiştan yan kesan da. : Ji welatê xwe dûr kevtin. |
| **Dûrkirin** | (k.jn.l.mê) Ji hev dûr kirin. Ji hev dû xistin. Ji hev dane paş. Jêk cudakirin. (K) bn : kirin. |
| **Dûrtir** | (n.hevberkirin) Pêtir dûr. Hêjta dûr. Jê pitir dûr. : Tu çend ji welatî dûrî, hevalê min hêjta ji te dûrtie. |
| **Dûrtirîn** | (n.hevber) Ji hemûyan dûrtir. Gelek dûr.Pir dûr. |
| **Dûrxistin** | (k.jn.l.mê) Dûrkirin. |
| **Dûv** | (n.x.mê) Kilk. Kurî. |
| **Dûvik** | (n.dar.mê) Dûv. |
| **Dûvlerzînk** | (n.l.mê) giyandar Corek çûçikane.Kurîreprepînk. |
| **Dûvmeqesk** | (n.l.mê) Kurîmeqesk. Hacîreşk. |
| **Dûvra** | ( hk.dem) Dûra. |
| **Dûvre** | (hk.dem) Dûvra. |
| **Dûzele** | (n.dar.mê) mûzîk bn :Dudik. |

# E

| | |
|---|---|
| **E** 1 | Pîta şeşê ji abeya kurdî. |
| **E** 2 | (pêrb) ***rêzman*** Alavê erênî, ang ;belê.Erê. : Te zad xwrîye?. ; E, min xwarîye. |
| **Ebloqe** | (n.x.mê) Abloqe. Dorpêç. |
| **Ebloqekirin** | (k.jn.l.mê) Abloqedan. |
| **Ebreş** | (hn.dar.çewa) Jina pa, zarokbûnê şîr di singan de nebe. |
| **Ebûqat** | (kar,n.x.dz) Parêzer. Berevankar. |
| **Ecel** | (n.c.mê) Nêzbûna mirina mirovî. |
| **Ecelhatin** | (k.jn.l.mê) Egerên nêzbûna mirinê zêde di bin û mirin di hêt. ***Pend*** :Ecela bizinê hat, nanê şivanî xwar. |
| **Ecem** | (netewe,n) Faris. Iranî. |
| **Ecemî** | (netewe,n) Mirovê ecem. |
| **Ecine** | (n.x.dz) Canên berze. Jimeçêtir. Jimebo,tir. |
| **Edav** | (n.x.mê) Daringekê nîvreqe,sipî ye dema kulbona birînan yan di nava pirsikan da kom û peyda di bit.Kêm. |
| **Edem** | (n.x.nêr) Adem. |
| **Efendî** | (hn.x.çewa) Efindî. |
| **Eferîn** | (pesindan) Aferîn. |
| **Efindî** | (hn.x.çewa) Xudanê sentor û pentoran. Mîrza. Seyda. |
| **Efganistan** | (hk.cih.cugir,n.l) Welatê efganan. |
| **Efganî** | (nejad,n.dar) 1. Xelikê Efganistanê.2. Kelûpelên ji Efganistanê. : Cilikên efganî. |
| **Efrîka** | (hk.cih.cugir,n) Kîşwera reş. Afrîka. |
| **Efrîkayî** | (nejad,n.dar) Efrîkî. |
| **Efrîkî** | (nej,n.dar) 1. Xelil ê Efrîka. 2. Kelûpelêd Efrîkî. |
| **Efsane** | (n.x.mê) Çîrok û serhatî yên dirêj û pir bûyer. |
| **Efser** | (pî,n.x.dn) Kesê piledar di nav hêza leşkerî da. Berpirsê serbazî. |
| **Efserî** | (karn.x.mê) Karê efseran. |
| **Efsûn** | (n.x.mê) Sehrebazî. Efsane. |
| **Eger 1** | (pêrb) ***rêzman*** Alavek girêdanê ye di risteyan(hevek) da jibo merc bi kar di hêt. :Eger te dem hebe, were cem me bi mêvanî. Eger xudê hez ket ez dê xanîyekî bi kirim. ***Pend*** :Eger gul nebî, stirî jî nebe. Heger. |
| **Eger 2** | (n.x.mê) Sedem. Ho. Hokar. : Egera nehatina wî nesaxî ye.Ka bêje eger çine te xwe sil kirî ?. |
| **Egîd** | (hn.x.çewa) Xweşmêr. Qehreman. Mêrxas. |
| **Eh** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo hicmetîbûnê yan dema mirovî bi gotin yan kiryarekê nexweş bit, bi kar di hêt. : Eh pa karek çak bo te kirî !. Eh eve çiye dîsan !. Eh dê bela xwe ji min veke!. |
| **Ehrîmen** | (n.dar.nêr) ***peyveka kevine*** Xwedayê şer û xirabîyê. Satan. Brx Hormiz. |

| | |
|---|---|
| **Ejdeha** | (n.x.nêr)1. Marê gelek mezin. 2.Paşayekê xwînmêj bû ko bi destê kaweyê asinger hatî ji nav birin.3. Candarên zebelah û dirinde. |
| **Ejdahak** | (n.x.nêr) Xwînmêjek efsaneyî ye sitemek mezin li gelê kurd dikir û bidestê kaweyê hesingir hat kujtin û kurd ji bêdadî a wî rizgar bûn û bi agirê Newrozê mizgînî da gel. |
| **Ejder** | (n.x.nêr) Ejdeha. Navê xor û keçan e. |
| **Ejdiyar** | (n.dar.nêr) Ejdeha. |
| **Ejnû** | (n.x) Çok. |
| **Elamet** | (n.x.nêr) Helamet. Dalho. |
| **Elho** 1 | (n.hn.x.n) ***balinde*** Tewalek mezin, goştxwer, û firindeye. Teyrê kelexan. 2. Kesê sivik û çespan [peyt]. |
| **Elho** 2 | (n..x.mê) Sinet. Sinetkirin. Birîn. |
| **Elhokirin** | (k.jn.l.mê) Birîna zêde goştê hedamê guhnelîyê nêr yê zarokan. Sinetkirin. |
| **Elind** | (n.x.nêr) 1.Spêdeka zû dema dinya ber bi zelalabûnê diçe.2.Navê mêrane. |
| **Elmas** | (n, biyan.x.nêr) Berekê bi biha ye. Almas. |
| **Elok** | (n.x.dz) ***balinde*** Tewalek malî yan kûvî, hêkkere. Mirîşkeşa. şamirîşk. Elîşîş. Coqcoq. |
| **Em** | (cihn. Pir) ***rêzman*** Kesê êkê yê piranî(gelek). : Em sê kesîn di malê da. :Em hevalêd hevin. |
| **Eman** 1 | .(pêrb) ***rêzman*** Alavê gazî û hewar kirinê ye. Hewar. |
| **Eman** 2 | (hk.cih.cugrn) Bajareke, paytextê welatê Erdenê ye. |
| **Emerîka** | (hk.cih.cugir, welat,n) Emrîka. |
| **Emrîka** | (hk.cih.cugir,n,welat) Welatek mezin ê rojavaye. Welatê Emrîkîyan e. |
| **Emrîkayî** | (nejad,netewe.n) Emrîkî. |
| **Emrîkî** | (nej.netewe.dz) 1. Xelkê Emrîka. 2. Mitayê ji Emrîka. |
| **Encam** | (n.x.mê) Dawî. Dumahî. Verêj. Ber. Berhem.:Encama hilbijartinan hêjta ne hatîye ragehandin. |
| **Encamdan** | (k.jn.l.mê) Kirin. Pêrabûn.Behemîn. : Li demek nêz qutabî dê taqîyên nîva salê encam bi den.(K) bn: Dan. |
| **Encame** | (n.x.mê) Hesinek kelabeye dergehan pê bi derî ve girê di den û bi sanahî dergeh di hê girtin û vekirin. |
| **Endam** | (n.x.dz)1.Mirovê bi awayê fermî, ser bi yane, dezgeh, part, û htd vebit. : ew endamê navenda civakî ye. Endama civata bajêrvanîyê. Endam di partîyekê da. 2.Pişkek, parçek yan pirtek ji leşê giyandaran. Hedam. |
| **Endamî** | (karn.dar.mê) Karê yan hebûna mirovî di dezgehekê da. |
| **Endaze** | (n.x.mê) Zanîna xwendina deng, kêşpîvan, sazî û htd, ya şêweyan. |
| **Endazeyî** | (hn.dar.çewa) şêweyê endazeye. |
| **Endazekirin** | (k.jn.l.mê) Pîvan. şêwekirin- Danan. (K) bn: Kirin. |
| **Endaziyar** | (pîşn.dar.dz) Mirovê xandina endaze bi dawî anîye û kar di ke. Pisporê warê endazeyê. |
| **Endaziyarî** | (karn.dar.mê) Karê têkelî bi zanîna endazeyê ve heye. |
| **Endelî** | (n.x.mê) *çûçik* Tîtîk. |

| | |
|---|---|
| **Enirandin** | (k.jn.x.mê) Torekirin. Hêriskirin. :Babê zarokê xwe enirand. (K) bdn: ez di enirînim em di enirînîn, tu di enirînî hûn di enirînin, ew di enirîne[..it] ewan di enirînin.Pr: dê bi +bdn. Bdb: di enirand, di enirandin. Db,dûr: enirandibû,... bûn. (F) : bi enirîne, bi enirînin. |
| **Enirîn** | (k.jn.x.mê) Gelek torebûn,hêrisbûn, xeyîdîn. : Bi nêre ewmirovê henê yê enirî.(K) bdn : ez di enirim em di enirîn, tu di enirî hûn di enirin, ew di enire[..it] ewan di enirin. Pr : dê bi+bdn. Bdb : ez di enirîm em di enirîn, tu di enirî hûn di enirîn, ew di enirî, ewan di enirîn. Db,dûr : ez enirîbûm, em enirîbûyn, tu enirîbûy, hûn enirîbûn, ew enirîbû, ewan enirîbûn yan(bibûn). |
| **Enitîn** | (k.jn.x.mê) Demê ko mirovek pir hêris di be entênî(intên) jê di hêt. Enirîn. (K) bdn : ez di enitim em di enitîn, tu di enitî hûn di enitin, ew di enite[...it] ewan di enitin. Pr : dê bi +bdn. Bdb : ez di enitîm em di enitîn, tu di enitî hûn di enitîn, ew di enitî ewan di enitîn. Db,dûr : ez enitî(bi)bûm em enitîbûyn, tu enitî bûy hûn enitîbûn, ew enitûbû ewan enitîbûn. (F) : bi enite, bi enitin. |
| **Enî** | (n.x.mê) 1.***leş*** Parçeya serê mirovî a rût û pan di keve hindava her du çavan du birû li serin. 2. Hevalbendî ya navbera çend part yan desteyan da. Qulp. Berok. |
| **Enîşk** | (n.x.mê) ***leş*** Cihê girêdana(gehiştina) zend û baskên mirovan. |
| **Entere** | (hk.dem.kevin.x) Rojeke ji yên seqem, ko di kevit meha kanînamezin, hember meha duwê. ***Pend*** :Entere, di kujit ga û kere, xudan yê bê xebere. ***Pend*** :Entere, heçîyê ji mal biçit dere, yê kere. |
| **Entîke** | (n.biyan.x) 1.Kevin. Gelek kevin.2. Seyr. |
| **Enzelok** | (n.dar.nêr) Zinc.Kolik. Holik. |
| **Erbetan** | (hk.cih.cugir.kevin) Paytextê dewleta mîdya bû. |
| **Erd** | (hk.cih.cugir,n.x.nêr) Tepa erdî. Aqar. Zevî. |
| **Erdçinî** | (n.dar.nêr) Erdê bi kêrî çandinê di hêt. Erdê çandî. |
| **Erdelanî** | (zarn.x) Zarek kurdî taybete li Kurdistana îran. |
| **Erdhej** | (n.l.mê) Erdhejîn. |
| **Erdhejîn** | (n.l.mê) Dema livîn di keve erdî û di hejit û gelek caran di bit egera çamên mezin. |
| **Erdîn** | (hk.dar.çewa) Tiştê têkilî bi erdî ve hebit. Ne esmanî. : Kenalê têlevizyonê yê erdîn. |
| **Erdnas** | (pîşn.l.dz) Kesê pispor di zanîna çînên erdî da. Cyoloc. |
| **Erdnasî** | (karn.l.mê) Zanîna pêkhatiyên erdî. Cyolocî. |
| **Ereb** | ( netewe,n.x.dz) Neteweyek mezine . |
| **Erebandin** | (k.jn.l.mê) Polîtîka rijêmên dagîkerên ereb li bajar û gundên kurdan ereb akincî di kirin û rûniştvanên kurd ji ser mal û warên wan der di êxistin jibo gorîna çand, cugrafî û ziman. |
| **Erebane** | (n.x.mê) Galiskeka du destike û xirxalek yan du hene jibo karûbarên çandin û avakirinê bi kar di hêt. |
| **Erebe** | (n.x.mê) Erebane. |

| | |
|---|---|
| **Erebistan** | (hk.cih.cugir,n.dar) Welatê ereban. Se`ûdî. |
| **Erebî** | (nej,n.dar.dn) 1. Zimanê ereban. 2. Kelûpelêd ji welatên ereban. |
| **Erebkarî** | (n.l.mê) Erebkirin. |
| **Erebkirin** | (k.jn.l.mê) Erebandin. |
| **Erê** 1 | (pêrb) ***rêzman*** Alavê eyînî.Alavê erêkirin. Belê. : Erê wesa ye. Erê ez bi tera me. Erê tu rast di bêjî. |
| **Erê** 2 | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo pisyarê bi kar di hêt . : Erê tu çi di bêjî heger ez xanîyê xwe bi firoşim?. Erê birayê te ne diyare, li kîve ye?. |
| **Erêbûn** | (k.jn.l.mê) Misogerbûn. |
| **Erêdanîn** | (k.jn..l.mê) Erêkirin. |
| **Erêkirin** | (k.jn.l.mê) Misogerkirin. : Min bilîta xwe erê kir, sube heger xudê hez ke dê ber bi Ewropa ve firim.***ingilîzî ang; OK***. : (K) bn: Kirin. |
| **Erênî** | (hn.dar.çewa) 1.Rasvekirî. Piştrastkirî. Hebûn.2. Çak.Pozetîv. Eyînî. |
| **Ergoş** | (hk.cih.cugir,nx.mê) Gundekê Kurdistanê ye. |
| **Ergoşî** | (malbat,n) Xelkê Ergoş |
| **Erik** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê seyr û hicmetîbûnê. Erik kuro tu dê çi bikî?. |
| **Erinîn** | (k.jn.x.mê) Hêrsibûna. Torebûn. Enirîn. |
| **Erînî** | (hn.dar.çewa) Erênî. |
| **Erjeng** | (hn.dar.çewa) Tirs. Sehim. |
| **Erk** | (n.x.nêr) Karê ku liser milêd mirovî ye, divê bihêt kirin. : Erk û maf li ser milên her welatîyeke hene. |
| **Ermen** | (nejad,n) Kesê ji netewe ermen bit. |
| **Ermenistan** | (hk.cih.cugir,n.dar) Welatê ermenan.Ermînya. |
| **Ermenî** | (nejad,n) 1.Ermen.2. Zimanê ermenan. |
| **Ern** | (n.x.mê) Kovan.Qehir. |
| **Erno** | (hn.dar.çewa) Kovandar. Dilkul. Hêris. Enirî. |
| **Ernok** | (hn.dar.çewa) Erno. |
| **Err** | (perb) bn :Erik. |
| **Errik** | (perb) bn :Erik. |
| **Erwend** | (hn.dar.çewa) 1.Jîr. Zana. Aqil. 2.Ciwan. Xweşk. |
| **Erzan** | (hn.x.çewa) Tiştê li bazarî bi parekê kêm û hejî bi hêt kirîn. : Gundor li bazarî gelek di erzanin. BRx Giran. |
| **Erzanbûn** | (k.jn.l.mê) Kêmkbûa bihayê mitay. Hatine xwara nirxa mitay. : Bihayê cilikan gelek yê erzan bûy. : Dê kengî kirê erzan bin ?. |
| **Erzanî** | (n.x.mê) Dema mita û keleûpel li bazaran erzan di bin. : Li cem me wek berê nemaye, noke erzanîye !. Brx Qetlazî.Giranî. |
| **Erzankirin** | (k.jn.l.mê) Kêmkirina bihayê kelûpelan. : Hikmetê biryar daye ku kirêya xanîyan bi hêt erzankirin. (K) bn : Kirin. |
| **Erzankirî** | (hk.l.çewa) Hatîye erzankirin. :Gundorên erzankirî bi kire!. |
| **Erzaq** | (n.x.nêr) Tiştê xwarina, wek ar, savar, birinc, nok, nîsk û htd. |
| **Erzêl** | (n.x.nêr) Kol.Kolik. Zinc. |
| **Erzên** | (n.x.mê) ***leş*** Pişkeka serê mirovî di keve bin devî, navbera lêva binî û gerdenê.Erzink. |

| | |
|---|---|
| **Erzink** | (n.x.mê) ***leş*** Erzên. |
| **Eskîmo** | (nejad,n) Neteyeke li Sovyeta berê di jîn. |
| **Esman** | (hk.cih..x.nêr ) Bilindî ya ko sitêr , roj û heyvan li himbêza xwe di girit, rengê şine. :Ji rdî heta esmanî ew jêk di cudane. |
| **Esmanî** 1 | (rd.dar.çewa) Rengê şînê wek ê esmanî. |
| **Esamanî** 2 | (hk.dar.çewa) Hêza bi karên esamî ra di bit, çi sivîl yan leşkerî. Firokeyên esmanî.Kenalên telefizyonê yên esmanî. |
| **Esmanger** | (karn.l.dz) Kesê pispor di warê gerana li esmanî bi firoke û rokêtan., li esmanan di gerin jibo karên zanistî. |
| **Esmangerî** | (kar.l.mê) Karê ku esmanger pê ra di bin. |
| **Esmer** | (hk,hn.x.çewa) Kesê dêmê wî ber bi reşî ve. |
| **Esp** | (n.x.nêr) *candar* Hesp. |
| **Estewir** | (hn.x.çewa) Stewir. Xirş |
| **Eşkence** | (n.x.mê) Lêdan . Qutanek berdewam. Êşandina deronî. Azar. |
| **Eşkencedan** | (k.jn.l.mê) Azardan. Lşandin. :Girtîyên ramyarî li girtîgehên dagîrkeran rojane di hên eşkence dan. (K) bn : Dan. |
| **Eşkencekar** | (karn.l.dz) Azarder. Zordar. Hov. |
| **Eşkencekirin** | (k.jn.l.mê) Azardan.(K) bn : Kirin. |
| **Eşkere** | (hn.x.çewa) Aşkera. Xuya. |
| **Eşkrebûn** | (k.jn.l.mê) Aşerabûn. |
| **Eşkerekirin** | (k.jn.l.mê) Aşkerakirin. |
| **Etûn** | (n.x.mê) Komir.Êtûn. |
| **Ev** | (cihn.nişadan) ***rêzman*** Eve. |
| **Evan** | (cihn.pir) ***rêzman*** Cihnavê nêz jibo nîşadanê yê pirînî. : Evan mirovan em hêlan û çûn. :Evan cilikan li ber xwe bi ke. BRx Ewan. |
| **Evandin** | (k.jn.x.mê) Hezkirin. Viyan. ***Pend*** :Nanê duca reşandî, zadê duca kelandî, bûka duca xemlandî tu dilan ne evandî. (K) bdn: ez di evînim em di evînîn, tu di evînî hûn di evînin, ew di evîne[….it] ewan di evînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di evand, di evandin. Db,dûr: Evandibû, ….bûn. (F) : Bi evîne, bi evînin. |
| **Evca** | (pêrb) ***rêzman*** Alavek girêdana ristane jibo berdewamî û misogerkirina bûyerê. Vêca. Jiber. Jiberko. |
| **Evdal** | (hn.dar.çewa) Reben. Jar. Bêkes.Perîşan. |
| **Eve** | (cihn.nîş.tek) ***rêzman*** Cihnaveke jibo nîşandana tiştê nêzîk. :Eve çîye?. :Eeve kîye?. :Eve tuyî li vêrê?. : Ha eve qelemê te, gelek supas. |
| **Evê** | (cihn.x.mê) ***rêzman*** Chnaveke ibo nîşadana tişt yan kesê mê yê nêz. :Evê jinê çi bi serê me anî. :Evê carê ez nahêm digel te.:Evê darê ne bire gunehe!. |
| **Evil** | (hn.dar.çewa) Peyveka darijtî ya kevne ang; di gel hilavêtina yekem bilqa avê. Êkê. Yekem. Avhil. Lezgîn. |
| **Evir** | (n.x.nêr) Ewir. |
| **Evîn** | (n.x.mê) 1.Hezkirina mirovan ji hevdu ra, ji jîyanê, jîngehê.htd. Vîyan . Hezkirin. Dilandin.2. Navê jinaye. |

| | |
|---|---|
| **Evînçirîk** | (hn.l.çewa) Kesê bihayê evînê nezanit. |
| **Evîndar** | (hn.dar.çewa) Kesê hez û evînî di ke armanca xwe. |
| **Evîndarî** | (n.dar.mê) Evînî. |
| **Evînî** | (n.dar.mê) Hezkirin. |
| **Evînîkirin** | (k.jn.l.mê) Evandin.Evînkirin. |
| **Evînkirin** | (k.jn.l.mê) Avandin. : Te çend caran di jiyanê da evîn kirî ye? |
| **Evînperwer** | (hn.l.çewa) Kesê evînî li cem pîroz. |
| **Evînperwerî** | (n.l.mê) Pîrozîya evînê. |
| **Evrandin** | (k.jn.dar.mê) Hinde bilin kir gehand evran.Pesindan. Rêzgirtin. Bdkirin. |
| **Evrav** | (hn.dar.çewa) Pîroz. Xudayî. |
| **Evraz** | (hk.cih.n.x.nêr) 1. Jêhelî. Jêlelî. Jûrda. Serî. ***Pend*** :Çi evraz di bê nişûvî nînin. ***Pend*** :Her evrazîyekî nişîvîyek heye. 2. Navêmêrane. |
| **Evrîşim** | (n.x.mê) Avirmîş |
| **Evro** | (hk.dem) Roja ko mirov têda. Ev roje.Îro. : Te evro çi kar heye?. : Evro cejina bûna mine. :Evro ne wek duhî ye. |
| **Evsar** | (n.dar.nêr) Hevsar. |
| **Ew** | (cih,n.tek) 1.Cihnavek teke , kesê sîyê ye. :Ew pismamê mine.Ew kîye?. Cihnavê pisyara nîşadanê :Ew çiye? Ew te çi got?. |
| **Ewan** | (cihn.pir) ***rêzman*** Cihnavek piranîye(gelek) , Kesê sîyê. Ewan ji mera diyarîyek anî. Ewam paran bi de hejaran. |
| **Ewçend** | (pêrb) Alavê pîvan û çendcarkirinê. Çiqas. |
| **Ewê** | (cih,n.tek. mê.nîşadan) ***rêzman*** Cihnavek teke, mêye, kesê sîyê ye.:Ewê şûkir. Ewê keçê çi got?. |
| **Ewha** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê hevberkirinê, destnîşankirin.: Ewha bi rêve ne ç!. Ewha ne bêje!. Weha. |
| **Ewir** | (hn.x.çewa,,n.x.nêr) Mij yan morana li esmanî peyda di bit, hin cara nizim û di bit baran , befir, terg. û htd.:Ewrekê reş û tarîli hindava çiyayê me diyar bû.:Dinya ewre. ***Pend*** :Ne ewrê girgirî, ne mêrê tirtirî.ang; ne merce ewrê dengdar baran û befir jê bibarin û mirovê dengûdorê di ket, mêrçak bit. |
| **Ewik** | (n.dr.dz) Tişt. Ew tişt. |
| **Ewî** | (cihn.x.nêr) ***rêzman*** Cihnavek teke, nêre, kesê sîyê ye. : Ewî got. Mala ewî(wî). |
| **Ewk** | (n.dar.dz) Ewik. |
| **Ewqas** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê nirxndin û nîşadanê ye. Wesa. Wek wê. Hindî. |
| **Ewqasî** | (pêrb) Ewqas. |
| **Ewropa** | (cugir,n) Kîşwera Ewropa. |
| **Ewropayî** | (nejad,n) Ewropî. |
| **Ewropî** | (nej,n) 1.Kesê xwedîyê nasnameya ewropa.2. Kelûpelên ji Ewropa. |
| **Ewt** | (n.x.mê) Dengê rewîna segan. Hef. : Ew vî seyî çîye ewt ewta wî?. |
| **Ewtandin** | (k.jn.l.mê) *seg* Weke mirov segan bi di rewandin. |
| **Ewitîn** | (k.jn.x.mê) *seg* Rewîn. :Se di ewite. |
| **Exlewîk** | (n.x.mê) Axlewîk. |

| | |
|---|---|
| **Ey** | (pêrb) ***rêzman*** Alava girêdana risteyane jibo hişyarîyê bi kar têt.:Ey bira. Ey eve çiye?. |
| **Eydî** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pêvegire. Tdî. |
| **Eylo** | (n.x.nêr) *teyr* Elho. |
| **Eylûl** | (hk.dem.n.x) *meh* Meha nehê. Meha yekê ji payîzê. Îlon. |
| **Eynî** | (hk.dem) Roja li paş pêncşembê di hêt. Roja niza li cem musilmanan. Pend : Heger pîr ya xêrker bit, eynî di mişene.ang: heger mirovî bi vê karek çak bi ke, li her dem û cih di kare bike. |
| **Eyreqîb** | (n.l.mê) bi Navdengtirîn siroda nîştimanî ya kurdî. |
| **Eywan** | (n.x.mê) 1. Balkon. Hewş. Berbank.2.Jor. Mezel. Ode. |
| **Eywax** | (alav. Keser) ***rêzman*** Ax. Dax. : Eywax dilo. |
| **Ez** | (cihn.tek) ***rêzman*** Cihnavek teke kesê êkê ye,dema mirov li ser xwe di bêjit. : Ez kurdim. :Ez ji te hez di kim. Ez nizanim nave te çî ye?. :(nêr)Ez yê mandî me. :(mê)Ez ya mandî me. |
| **Ezbenî** | (hn.dar.çewa) Pesindane jibo rêz û rûmet girtin bi kar di hêt. Hêja. :Ezbenî kerem ke. :Belê ez benî, min hay ji te heye. |
| **Ezber** | (hn.dar.çewa) Gotina mirov di serê xweda tomar bi kit. Jiber. |
| **Ezberkirin** | (k.jn.l.mê) Jiberkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Ezezî** | (hk.l.çewa) Kesê herdem û her tişt ji xwe re bi vêt û pesina xwe bi det. :Tefşê beroka xwe. |
| **Ezitî** | (hk.dar.çewa) Ezezî. |
| **Ezman** | (n.x.nê) 1. ***endam*** Hedameke di devîda ye ku jibo tamkirin û axivtinê alîkarîyê diket.2. *rêzman* Ziman. |
| **Ezmandirêj** | (hn.l.çewa) Mirovê gelek axivtinên ji xwe mezintir di ket. Bê perwerde. Lewçe. ***Pend*** : Ezmanê dirêj darkokê sere xudanî ye. |
| **Ezmanpîs** | (hk.l.çewa) Ezmanreş. |
| **Ezmanreş** | (hn.l.çewa) Kesê hergav axivtinên kirêt di kit. Civînan di det. |
| **Ezmansork** | (n.l.dz) ***kevin*** Mirovên di çîvanokanda jibo tirsandina zarokan bi kar di hên. |
| **Ezmanxweş** | (hk.l.çewa) Mirovê gotin û selîqeyên dilveker di ket. Kêfxweş. |
| **Ezmûn** | (n.x.mê). Nirxandin yan sengandina karê mirovî. Taqî. |
| **Ezmûnkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov xwe taqî di ke dako kar û xwandina xwe di de sengandin. :Meha bi hêt dê ezmûnên serê salê li dibistanan (bi) hên kirin. |
| **Ezperist** | (hn.l.çewa) Ezezî. |
| **Ezperistî** | (n.l.mê) Ezezî. |

# Ê

| | |
|---|---|
| **Ê** 1 | . Pîta heftê ji abeya kurdî. |
| **Ê** 2 | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pejirandinê ye. Erê. E. :Suba were cem me, Ê; başe ez dê hêm. |
| **Ê** 3 | . (paşgir.hd,gazkirin) Paşgira gazîkirinê jibo mê. Xuşkê . Yayê. Jinê. Hevalê. |
| **Ê** 4 | (pêrb) ***rêzman*** Alavê daxwazkirina berdewamîyê di gotinan da. Ê dê dê bêje, ka çi lê hat!. |
| **Ê** 5 | (cihn.nediyar.nêr) Yê. ***Pend*** :Ê ne li şerî, şêre. |
| **Êdin** | (pêrb,a.destniş.nêr) ***rêzman*** Peyveke dihêt bi kar anîn jibo helbijartina tiştan ji hev. Êkê dî. Yekê din. : Ev ne êdin. |
| **Êd** | (n.cîhanî.mê) Çevengeke di navnîşanên nameyên eliktironî da bi kar di hînin. |
| **Êdî** | (pêrb) *rêzman* Alavek girêdanê , di dawîya nivêsînê da jibo kilîldana mijarê. :Nivîsara min bi dawî hat, êdî supas bo hewe. Ji nih û paşve. :Ez êdî na herim mala wan. |
| **Êgcar** | (hk.dem) 1. Êkcar bûyera carek rû di de.2. Rehayî. Êgcar ne wusa !. |
| **Êk** | (hijn.çend)Hijmareke paş çune dest pê di kit. 1. 4-3=1.Yek. Nîva duwê. : Xudê êke. |
| **Êkane** | (hn.dar.çewa) Daybabên bi tinê êk kur yan keç hebin. kur yan kiçên bê xwîşk û bira.. Berazê bê xuşk û bira. :Kurê mala cîranê me gelek ê nazandî ye, çunke êkaneye. |
| **ketî** | (n.dar.mê) Hevgirtin. Yekêtî. Êkgirtin. |
| **Êkê** | (hn,x,çend) 1 Tiştê, kesê mê , nedîyar. êkê(jinek) we got. 2Rêzkirina tiştî, ya êkê. |
| **Êkgirtin** | (k.jmê) Bi hevra kar, xebat kirin bo êk armanc.Hevalbendî. Biraynî. Tebayî. (K) bn :Girtin. |
| **Êkî** | (hn,nedîyar.nêr) Kesê nêr yê ne dîyar, :Êkî yê birî. Êkî got. |
| **Êkmale** | (cugirn) Navên gelek gundane li Kurdistanê. Malek. |
| **Êkser** | (rd.l.çewa) 1. Tiştê demildest rû di det. Zindî. :Bername bi awayekê êksere. 2. Êk alîÊk sent. Êk araste. :Min bihêleka(tikêt) êkser kirî. |
| **Êl** | (n.x.nêr) Avahîyê pir mirov ûxanedan. Xîvetgeh. Kuçerat. Hoba. |
| **Êlçî** | (n.l.dz) Zêrevanên êlî. Leşkerê mîr, paşa, yan êlî. |
| **Êleg** | (n.x.nêr) Elek. |
| **Êlek** | (n.x.nêr) çoxikê ji perûkan çêkirî. |
| **Êlinc** | (n.x.mê) *candar* Hestîyên milî. Kelkelk. |
| **Êlincî** | (n.x.pir) Rewşeke mirov têda gêj di be ji egara xwarineka pîs di gedê mirovî da yan dîtina tiştekê gemar,dengek bolbolî ji devî û gerîyê peyda di be,dev pirî av di be û nêzîke dilê mirovî ra bi be(mirov bi hilîne). |
| **Êlincîhatin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov hest bi êlincîyan di ke û nêze dê mirov verişit. Êlincî yêd di hêne min, ez bawer di kem dilê min dê rabit. (K) bn:Hatin. |

| | |
|---|---|
| **Êlincîkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov dixwaze êlincîyan bike jibo ko bi kare zadê di zikî da bi hilîne. (K) bn:Kirin. |
| **Êm** | (n.x.mê) Alîka lawiran. Alîka candaran. |
| **Êmdan** | (k.jn.l.mê) Alîdan. Xwarin dane kewalan. |
| **Êr** | (n.x.nêr) Agir. |
| **Êre** | (hk.cih) Hêre. Hire.Vêre. Vêrê. Vê dirê.Vê derê. |
| **Êriş** | (n.x.mê) 1.Biser cihekî da girtin jibo dagirkirin yan rizgarkirn.2. Dabezîne ser alî yan kesekî bi rêya ragehandinê. Hêriş. |
| **Êrişber** | (karn.dar.dn) Yê ku êrişê di bit ser berdijê xwe.Hêrişber. |
| **Êrişbirin** | (k.jn.l.mê) Hêrişkirin. (K) bn : Birin. |
| **Êrişkar** | (karn.dar.dz) Hêrişber. |
| **Êrişker** | (karn.dar.dz) Hêrişber. |
| **Êrişkirin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov êrişê di ke ser kes, yan birekê. : Gurî êriş kir ser kerê bizinî. (K) bn : Kirin. |
| **Êsik** | (n.x.nêr) *candar* Hestî. |
| **Êsta** | (hk.dem) Nuke. Vê bavê.Niha. |
| **Êstir** 1 | (n.x.mê) Rondik. |
| **Êstir** 2 | (n.x.dz) *candar* Hêstir. |
| **Êş** | (n.x.mê) 1. Nexweşî. Nesaxî. Derd. 2. Jan . ***Pend*** :Çi kes wek xudanî êşa leşê xwe nizanit. |
| **Êşan** | (k.jn.x.mê) êsana leşî ye. Derd. (K) Bdn: Ez di êşim em diêşîn .tu di êşî hûn di êşin. Ew di êşe[..it] ewan di êşin. PR : dê[bi]+ bdn. Bdb: di êşam, di êşa, di êşay, di êşan.Db,dûr. Êşabû,…bûn.(F) : bi êşe, bi êşin. |
| **Êşandin** | (k.jn.x.mê) Mirov, giyandar ji alîyê kes yan desteyekê ve bi hêt êşandin. Yan kekî azar bide. Azardan.(K): Bdn; ez di êşînim em di êşînîn, tu di êşînî hûn di êşînin, ew di êşîne [..it] ewan di êşînin. Pr: dê [bi] êşînim, êşînîn,êşînî,êşînin, êşîne[..it], êşînin. Bdb : Di êşand, di êşandin. Db,dûr êşandibû,... bûn. (F): bi êşîne bi êşînin. |
| **Êşîn** | (k.jn.x.mê) Êşandin. (K) bdn : ez di êşim em di êşîn, tu di êşî hûn di êşin, ew di êşe[..it] ewan di êşin. Pr : dê bi +bdn. Bdb : Ez di êşam, em di êşayn , tu di êşay, hûn di êşan, ew di êşa, ewan di êşan. Db,dûr : ez êşabûm, em êşabûyn(bûn), tu êşabûy(bû), hûn êşabûn, ew êşabû, ewan êşabûn. (F) Bi êşe, bi êşin. |
| **Êtîm** | (hn.x.çewa) Zaroyên bê dayk yan bab. Babmirî. Daykmirî.Sêwî. Bêsemyan. |
| **Êtîn** | (n.x.mê) Cihê asin têda di hêt bihujandin[helandin].Kurha asingiran. |
| **Êtûn** | , (n.x.mê) 1.Avahîyek heremîye bi axê dirist di ken daran tê dixin jibo sotinê dako rejîyê jê peyda bi kin. Komir. 2.Germîya herî pile bilind.3. Bizotê agirî. |
| **Êvar** | (hk.dem.mê) 1. Daneke ji rojê, piştî nîvro.Berî bibit şev.2. Navê kur û keçane. |
| **Êvaran** | (hk.dem.dar) Dema êvarî. Li êvaran. :Hemû êvaran ez guhdarîya nûçeyan di kim. |

| | |
|---|---|
| **Êvarbaş** | (silav.pîroz) Silava êvarî. : Daxwaza êvareka xweş û baş jibo êkî bêjî. :Êvarbaş heval. |
| **Êvarî** | (hk.dem) Demê roj be bi rojava ve di çe. Danê êvarî. Kengî dê te bînim?. Êvarî. |
| **Êvitîn** | (k.jn.x.mê) *nexweşî* Cihê ji egera lêdanekê yan kulbûbûn birîndarbûnê reş û şîn di be û bilind, pif di be. Perçivîn. Werimtin. |
| **Êvnî** | (hn.x.çewa) Leşê bi hêz. Leşê peyt. Mirovê peyt. Mirovê lêkdayî. |
| **Êvnîk** | (hn.dar.çewa) Peyt. Saxlem. Sirt. |
| **Êvnûte** | (hn.x.çew) Êvnî. |
| **Êxistin** | ( k.jn.x.mê) 1.Dema mirov tiştekî, kesekî li erdî bi de yan ji bilindîyê bi êxe xwarê. Li erdî dan. Xistin. :Cilêd xwe êxistin. : Du mirovan xwe lêkdan êkê êk êxist. 2. Pêvekirin. Pêkvekirin. Girêda. :Dervankê avdankî bêxê(bi êxê). :Kaxez êxist dîwarî. (K) Bdn: ez di êxim, em di êxîn, tu di êxî, hûn di êxin, ew di êxe[..it], ewan di êxin. Pr: dê [bi] + bdn. Bdb: êxist, êxistin. Db,dûr. Êxistibû,… bûn. (F) bi êxe, (bi êxê)bi êxin(bi êxinê). |
| **Êxre** 1 | (n.x.mê) Dirwareke li derên xirar, gonî, telîsan di din jibo ko kurt û peyt bi be. |
| **Êxire** 2 | (n.x.mê) Rizdeya kevirî. êxir a çiyayî. |
| **Êxsîr** | (hn.x.çewa) Dîl. Girtî . bend. |
| **Êxte** | (n.x.dz) ***canda( dewarr)*** Hêstir. |
| **Êxtiyar** | (hn.x.çewa) Navsalveçûyî. Pîr. Kal. |
| **Êzdan** | (n.x.nêr) Xuda. Xwedê. Ezdan. |
| **Êzdî** | (hn,nl.dz)1.Kevitirîn dîn(ol) a kurdane. 2. Kesê bawerîya wî bi dînê êzdîyan hebe. |
| **Êzdîxane** | (hk.cih,l.mê) Bingeha êzdîyan. Civaka êzdîyan. |
| **Êzdîyatî** | (n.dar.mê) Belavkirina ola êzdîyan. Xebat jibo saxkirina dînê êzdîyan. |
| **Êzing** | (n.x.nêr) Dar. Kête. Nîre. |
| **Êzingvan** | (n.dar.dz) Darvan. Darbir. |
| **Êzmûg** | (n.x.mê) Êzmûk. |
| **Êzmûk** | (n.x.mê) *adî* Tevinpîrk. |

# F

| | |
|---|---|
| **F** | (fe) Pîta heşt ê ji abeya kurdî. |
| **Fabrîqe** | (n,biyan.mê) Kargeh. : Ferhad li fabrîqê kar di ke. |
| **Fafon** | (n.x.mê) Daringekê reqe wek asinî ,piranî ya amanan jê di hên çêkirin. |
| **Fal** 1 | (hn.x.çewa) Candarê nêr yê ne xesandî ko ji alîyê guhnelî ve yê peyte û bi kêrî perînê di hêt.. :Hespê fal. Nêrîyê fal. :Kerê fal. |
| **Fal** 2 | (n.x.mê) Falik. |
| **Falavêj** | (pîşn.l.dz) Falveker. |
| **Falbêj** | (pîşn.l.dz) Falveker. |
| **Falbêjî** | (karn.l.mê) Karê vekirina falikan. |
| **Falbîn** | (pîşn.l.dz) Falveker. |
| **Falgir** | (pîşn.dar.dz) Valveker. |
| **Falik** | (n.x.mê) Dîtin yan aşkerara kirina paşeroja mirovî çi bi nêrîna panka destî yan fincanê dema qehwe bi dawî di hêt. |
| **Falinc** | (n.x.mê) Nexweşîyeke(nesaxî) demarane mirov pê şil di bit ji egerên zikmakî, nivşî yan derekî, nemaze zaroyan di girît. |
| **Falincbûn** | (k.jn.l.mê) Rastî derdê falincê Hatin. (K) bn: Bûn. |
| **Falincgirtin** | (k.jn.l.mê) Falincbûn. |
| **Falveker** | (pîşn.l.dz) Kesê bi falikan paşeroja mirovî diyar di ket. |
| **Falvekirin** | (k.jn.l.mê) Vekirin û nêrîna bextê mirovî bi falikan. (K) bn: Vekirin. |
| **Fanêle** | (n.x.nêr) Cilikekê tenike li bin kiras û cilkên dî di ken ber xwe, hiçikkurte yan bi lepike. Bincilk. |
| **Fanos** | (n.x.mê) Core çirayeke. Lempe. Fener. :Fanosê hilke (pêke). :Li ber ronahîya fanosê di xwînîn. :Jineka hinde cane wek fanosê. |
| **Faris** | (nejadn.x.dz) 1.Neteweyeka Iranîye.2. Kesê farisîziman. |
| **Farisî** | (ziman,n) Zimanê farisan. |
| **Farzik** | (hn.dar.çewa) Çavbirçî. Çavbirsî. |
| **Fasolî** | (n.x.mê) *çandin* Giya û berê giyayekî ye, dindik biçûke gelek cor û reng hene. |
| **Faşîzm** | (n,biyan) Sîstemek zordar û dirindeye. |
| **Faşist** | (hn,biyan.dar.çewa) Zaravek ramyarîye, kes yan desteya dardest û zordar xwe bi ser xelkî da bi sepînit. |
| **Fatareşk** | (n.dar.mê) *leşzanî* Xalxalk. |
| **Fatfatîk** | (n.dar.mê) *tewal* Kevoka kûvî. Kokuxtî. |
| **Fatîk** | (n.x.mê) *adî* Margîsk. Bîkmar. |
| **Fatmok** | (n.dar.mê) *tewal* Fatfatîk. |
| **Feç** | (hn.x.çewa) Mirovê difina wî biçûk û serevraz. |
| **Feçer** | (hn.dar.çewa) Mirovê feç. |
| **Feçê** | (n,gazkirin.mê) Bangkirin û naznavê jina feç. |
| **Feço** | (hd,gazn.dar.nêr) Gazîkirin û naznavê kur,zelamê(peya) ê feç. |
| **Feda** | (hn.x.çewa) Qurban. |

| | |
|---|---|
| **Fedakar** | (pîşn.l.dn) Kesê xwe di ke qurban , gorî dozekê. |
| **fedakarî** | (karn.l.mê) Xwe gorîkirin. Xwe fedakirin. |
| **Fedakirin** | (k.jn.l.mê) Gorîkirin. Qurbankirin. (K) bn: Kirin. |
| **Federal** | (zarav,biyan) Hevalbend. Êketîya bi hez û viyan. |
| **Federalî** | (zara,biyan) Sîtema bi hevra kar-xebarkirin. |
| **Fedî** | (n.x.mê) Serim.:Ma ne fedî ye tu wesa di kî ?. |
| **Fedîker** | (rd.dar.çewa) Sermîn. Sermok. |
| **Fedîkirin** | (k.jn.l.mê) Serimkirin. : Ew fedî di ke, lewra na xwaze bi stire. (K) bn: Kirin. |
| **Fedîtî** | (n.dar.mê) Serim. |
| **Fedok** | (hn.dar.çewa) Fedîker. :Zarokê fedok. Jina fedok. |
| **Fehêt** | (hn.dar.çewa) Serim û fedîyek mezin . Kirêt. |
| **Fehêtîn** | (k.jn.x.mê) Serimkirin. Fedîkirin. (K) di fehête, bi fehêtin. |
| **fehil** | (hn.x.çewa) *candar* Fal. |
| **Felaqe** | (n.x.mê) Qutan û lêdana binê pêyan. |
| **Felaqedan** | (k.jn.l.mê) Core lêdaneke bi dar û qamçîyan li binê pêyên mirovan di din. (K) bn : Dan. :Daykê kurê xwe felaqe da, çunkî dizî kiribû. |
| **Fele** | (dîn,n.x.dz) 1. Dînê mesîh. 2. Kesê mesîhî. |
| **Felek** | (n.x.mê) 1. Çerx. Zeman. 2. Navê keçan. |
| **Felestîn** | (hk.cih.welat,n) Welatek erebane axa felestînîyane. |
| **Felestînî** | (nejdad,n) 1. Xelikê welatê Felestîn. 2. Kelûpel yan mitayê ji Felestînê. |
| **Felît** | (hn.x.çewa) Felîte. |
| **Felîte** | (hk.x.çewa) Mirovê bi kêrnehatî. Kurê kulana. Kulanî. Selatî. Pûç. |
| **Felîtebûn** | (k.jn.l.mê) Mirovê ji rêya çak derkeftî û karên xirab diket.: Kurê wî yê bûye felîte, êdî li mala xwe na rawestit. |
| **Felte** | (hk.x.çewa) Mirovê, xasime jina pûç. |
| **Felteyî** | (n.dar.mê) Karê felte. Karê pûç. pwîçatî. |
| **Fend** | (n.x.mê) Find. Çira. Lemp. |
| **Fenek** | (n.x.mê) ***amêr*** Panka bayî. |
| **Fener** | (nax.mê) Lempe. Çira. |
| **Fenik** | (hn.x.çewa) Honik. Hîn. Fênik. :Bi şev gundê me pir feneke. |
| **Feqî** | (pîş.x.dz) Xwîndkarê dînî, yê li mizgeftan waneyên ola Islamê di xwînin. Soxte. |
| **Feqîyatî** | (karn.dar.mê) Karê feqîyan yê xwendin û hînbûna zanista dînî. |
| **Fer** | (pêrbest.x) Pêdvî. Giring. Hejî. :Ya fere bêjîn, |
| **Feraşîn** | (hk.cih,n.x.mê) 1 Deverek hîn û biyav xweş , dilveker li Kurdistana bakûr. 2. Zozan û cihên xweş û fênik li Kurdistanê. |
| **Ferat** | (cugirn) Çemekê mezine li Kurdistanê. Rîbarê furat. |
| **Ferde** | (n.x.nêr) Tûrik yan gonî yê dexil û danî dikenê. Telîs. |
| **Fereh** | (hn.x.çewa) Fireh. |
| **Ferhad** | (n.x.nêr) 1. Naveke di dastana ferhad û şirîn da hetîye. Evîdarê şirînêye.2. Navê kurane. |

| | |
|---|---|
| **Ferheng** | (n.x.mê) Pertoka rêzkirina peyvan û pejna(raman) wan çi bi şirove kirin bit eger yek ziman be yan hember bi zimanek din.Zanîna peyvan. |
| **Ferîşte** | (n.x.nêr) 1.Firîşte. Milyaket.2. Zerî. Perî. |
| **Ferman** | (n.x.mê) 1. Qirkirina bi komel. Jinav birina neteweyekî. Pakkirina nejadî.Cînosayd. 2. Navê jinane. |
| **Fermanber** | (karn.dar.dz) Kesê li rêvebirîyekê kar di kit mehyanê ji dezgehekî werdigirit. |
| **Fermandan** | (k.jn.l.mê) Biryara karekî fermanekê bi hêt derbazkirin. (K) bn: Dan. |
| **Fermandar** | (kar,n.dardz) 1.Desthelatdar. Xwedî biryar. Karbidest.Serok.2. Serleşker. Qumandar. |
| **Fermankirin** | (k.jn.l.mê) Fermandan. |
| **Fermanname** | (n.l.mê) Nameya ku têda ferman di hêt nivîsîn û ragehandin. |
| **Fermî** | (hn.x.çewa) Biryarên qanûnî yên ji dezgehêd qanûnî derbaz di bin. :Encama dengdanên civata bajêrvanîyê bi awayekê fermî hat ragehandin. |
| **Fermîn** | (k.jn.x.mê) Keremkirin. |
| **Fermo** | (k.ferman) Jibo rêz û rû met bi kar di hêt. Keremke.:Fermo were nav malê. :Fermo zadî bi xo. :Fermo rûne. |
| **Ferşik** | (n.x.mê) Berek pane jibo nivêjan bi kar di hêt. Helankê nimêjan. : Nivêja xwe liser ferşikî kir. |
| **Fesad** | (hn.x.çewa) Mirovê axivtina di navbera kesan da di veguhêzit. |
| **Fesadî** | (n.dar.mê) Axivtin veguhaztin. Durûyî. |
| **Fesadîkirin** | (k.jn.l.mê) Axivtin veguhaztin. (K) bn: Kirin. |
| **Feşkilandin** | (k.jn.dar.mê) Pûçkirin. Herifandin. Ji nav birin. |
| **Feşkilîn** | (k.jn.x.mê) Pûçbûn.Heriftin.ji navçûn. |
| **Fetisandin** | (k.jn.dar.mê) Heger mirov tiştekî, giranîyekê danit yan bikevit ser devî ku rêya hatinûçûna bayî bo nav singî rawestînit di bit egera mirinê. Bêhinçikkirin. (K) bdn: ez di fetisînim, em ewan di fetisînin. Bdb: di fetisand, di fetisandin. Dê fetisînim, dê fetisînîn. |
| **Fetisîn** | (k.jn.x.mê) Bêhinçikbûna mirovî yan candaran ta di mirit. (K) di fetisit, di fetisin. dê bi fetisit, dê bi fetise. bi fetisin.: Dergehî veke, heger dê fetisîn. |
| **Feylî** | (malb,devn) 1.Devereke kurdane li Kurdistana Iraq û Iranê. 2. Zaravek kurdî ye.3.Kesê feylî, xelkê devera feylî lê xwecih. |
| **Fêkî** | (n.x.nêr) Fêqî. |
| **Fêl** | (n.x.mê) Xapandin.Serdabirin. Xap. |
| **Fêlbaz** | (hk.dar.çewa) Xapînok. |
| **Fêlkirin** | (k.jn.l.mê) Xapandin. |
| **Fênik** | (hn.dar.çewa) Cihê xweş û dilveker , sar li havînê. Hwîn.Honik. :Spêdeyeka fênik. |
| **Fêqî** | (n.x.nêr) Berê darên bi ber ko piranî tam şirîninin, mîna sêv,xox, zerdil, tirî, gundor û htd. ***Pend*** :Fêqîyê zivistanê zarokin. |
| **Fêr** | (n.x.mê) Zanîn. Xwendin. |
| **Fêrbûn** | (k.jn.l.mê) Çewayîya wergirtina waneyan, yan her karekî. hînbûn. . :Ez di xwazim fêrê zimanên biyanî bi bim. (K) bn :Bûn |

| | |
|---|---|
| **Fêrbûyî** | (hk.l.çewa) Kesê fêrî karekî bûye. |
| **Fêrdar** | (pî(n.dar.dz) Fêrvan. |
| **Fêre** | (n.x.mê) Wane.:Fêreya zimanê kurdî. |
| **Fêrgeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê fêrbûna xwendekaran yên law. Xandingeha paş berhevî yê. |
| **Fêris** | (hn.x.çewa) Pelewan. Hêja. Pehlewan. Zîrek. |
| **Fêrkirin** | (k.jn.l.mê) Hînkirin. .:Ez dê xwe fêrî zimanê farisî bi kim.:Te xwe fêrî hajotina tirombêlan kir?. (K) bn: Kirin. |
| **Fêrvan** | (pî(n.dar.dz) Kesê xelik li ber destê wî fêr di bin. Mamosta. Seyda. |
| **Fêsad** | (hk.x.çewa) Bekirok. Fesad. |
| **Filan** | (hk.x.çewa) Kesê, yan tiştek nedîyar. :Filan kesî got. Filan tiştî ji min ra bîne.Bêvan. |
| **File** | (dîn,n.x) Fele. |
| **Filfil** | (n.hnx.dz) 1.şînkatîyeke, bi xavî û lênan tê xwarin, gelek cor û tam hene ; mina ;,tîj , şirîn . Bîber.2.Mirovê dujwar. Har. |
| **Filipîn** | (hk.cih.cugir,n) Welatê filipîn. |
| **Filipînî** | (netewe,n) 1. Xelikê filipînê. 2. Kelûpel yan mitayê ji Filipînê. |
| **Filis** | (n.x.nê) Êk ji hizara dînra Iraqî ye. Wek sent li hind welatên dî. |
| **Filitîn** | (k.jn.x.mê) Peşîn. Firîn. Qurtalbûn. |
| **Filîte** | (hk.x.çewa) Felîte. |
| **Fincan** | (n.x.mê) Kopên vexwarina qehwê, çayê û htd.:Fincanekaqehwê dana ber mêvanî. |
| **Find** 1 | (n.x.mê) Çira. Fener. şemalk. |
| **Find** 2 | (n.x.mê) Fêl. Xap.: Ew zelamekê bi finde. |
| **Finddank** | (n.dar.mê) Amankeke findikê yan şemalkê têda di danin.:Bê zehmet şemalkê bi di finddankê da. |
| **Findiq** | (n.x.mê) Bindeq. |
| **Fiqeroşk** | (n.dar.mê) Kivark. Kukavoşk. |
| **Fir** 1 | (n.x.mê) Piçeka avê ko mirov bi carekê di qurçîne. Qurç. : Fireka avê, çayê, şîrî û htd. |
| **Fir** 2 | (n.x.mê) Firîneka kurt. Lûtik. Xwe avêtin. ***Pend*** :Kes bi firekê na gehit serê milekê. |
| **Fir** 3 | (rd.x.çewa) Fireh. :Gava fir. Ang; gava ji hev dûr. |
| **Firajîn** | (k.jn.x.mê) ***darûbar*** Pişkovkdan. Pişkdan. :Darên rezan yên ririjîn. |
| **Firake** | (n.x.mê) Cihek bilind, kendalek bilind. Lat. Kevirên bilind ko mirov û candar liser dikevin û di firin. |
| **Firandin** | (k.jn.dar.mê) 1.Dema tewal têjikên xwe ji hêlînê der di ke û di firîne. 2. Havêtina ber,dar kevir û htd.(K) bdsn: Ez difirînim em di firînîn, tu di firînî hûn di firînin, ew di firîne[..it] ewan di firînin.Pr: dê bi +bdn. Bdb: di firand, di firandin. Db,dûr: firandibû, ...bûn. (F): bi firîne, bi firînin. |
| **Firavîn** | (n.x.mê) Xwarina danê nîvro. Zadê nîvro. :Firavîna evro tirşike, îpraxe.savare. û htd. |
| **Firawan** | (hn.x.çewa) Fireh. |

| | |
|---|---|
| **Firax** | (n.x.pir) Aman. |
| **Firçe** | (n.x.nêr) Alaveke ji davan hatî çêkirin destikdare,jibo paqijkirina didanan, yên mezin jibo malan. Gêzik. Havlêk. |
| **Firçekirin** | (k.jn.l.mê) Didan firçekirin; paqijkirina didanan bi firçeyê didanan. Firçikirina malêa;ang malîna malê bi firçeyê mezin. |
| **Firdik** | (n.x.mê) Xwarineke ji nan û dew, yan nan û mast yên têkel pêkhatîye. |
| **Firefir** | (hk.dar.çewa) Dengeke ji devê dewaran di hên, yan mirovê persîvdar.:Te çiye firefira te?. |
| **Firefirkirin** | (k.jn.gl.mê) Candar û mirov dengê firefirê ji devê xwe di hînnin. (K) bn: Kirin. |
| **fireh** | (hn.x.çewa) 1.Yekeya pîvanê jibo panîya tiştî bi kar têt. Vedayî. 2.Pir.Çir. Mezin. Cilkên fireh, xanîyê fireh, htd. Brx Teng. |
| **Firehbûn** | (k.jn.l.mê) Mezinbûna qebare. Jiberêk hatin der. Dema tişt fireh di bit. :Cilik firehbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Firehî** | (n.dar.mê) ***endaze*** Yekeya firehbûna tenan. Çudîya firehbûnê.: Firehîya xanî, zevî, bîstan û htd. |
| **Firehkirin** | (k.jn.l.mê) Jêkrakêşana tiştî ta fireh bi be. Mezinkirin.:Coya avê fireh bi ke!. :Bêhina xwe fireh kir. (K) bn: Kirin. |
| **Fireng** | (nejad,n) Ewrpayî. |
| **Firengistan** | (hk.cih.cugr,n) Ewropa. |
| **Firengî** | (nejad,n) Fireng. |
| **Firensa** | (hk.cih.cugr,n) Welatekê ewropayî ye. |
| **Firensayî** | (nejad,n) 1. Xelkê Firensa.2 .Kelûpelêd ji Firensa. |
| **Firensî** | (nejad,n) Firensayî. |
| **Firêzer** | (nbiyan,x.mê) Amêrekê wek sindoqe, xwarin û fêqî tê dixin dako tezî bi be û ji xirabbûnê bi hêt parastin. |
| **Firfire** | (n.dar.nêr) Perwane. |
| **Firfirok** | (n.dar.mê) Virvirok. Firoke. Firinde. |
| **Firgeh** | (hk.cih.dar.mê) Firokexane. Firîngeh. |
| **Firin** | (n.x.mê) Cihê patin û firotina nanî. |
| **Firinde** | (n.dar.mê) Firoke. |
| **Firî** | (n.x.mê) ***spîyatî*** Berhemek rêçalî ye rojên êkê piştî zana giyandaran ko ji kelandina şîrî çê di bit. ***Pend*** :Li hîvîya firîyê gay man.ang; li benda karekî ko bi zehmet hebûna wî heye. Gazîya dûv gurî. |
| **Firîn** | (k.jn.x.mê) Hatin û çûna tewalan, çûçikan û firokeyan divalayîyê da (li asmanan )bi şaperên xwe.***Pend*** :Yê bilind bi firit, dê nizim bi erdî kevit. (K) :Bdn : ez di firim em di firîn, tu di firî hûn di firin, ew di fire[…it]ewan di firin. PR: Dê[bi]+ bdn. Bdb : Di firîm, firîn, firî, firin. Db,dûr : firîbûm, …bûyn,… bûy,..bû.. bûn.(F) :bi fire, bi firin. |
| **Firîngeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cîyê firoke lê di nîşin û difirin.Firokexane |
| **Firîşte** | (n.x.dn,hn.x.çewa) 1. Melayketên ji asmanan tên xwarê jibo bi cih anîna hezên xuda.2.Çembera ciwanî yê. Zerî. Perî. |
| **Firîz** | (n.x.nêr) Firîzî |

| | |
|---|---|
| **Firîzî** | (n.x.nêr) ***giya*** Giyayek keske li baxan di çînin jibo ciwanîyê. |
| **Firne** | (n.x.mê) Cihê nan patinê. Tenîr. |
| **Firnik** | (n.dar.mê) 1. Firneya biçûk. 2. Kunêd difnê. Bêvil. |
| **Firo** | (n.x.nêr) Firî. |
| **Firoke** | (n.dar.mê) Makîneyeka mezine bi hêza agirî li bilindîyan di firit jibo karên veguhastin û leşkerî mifa jê têt wergirtin. Balefir. |
| **Firokevan** | şpî(n.dar.dz) Kesê firokeyan di firîne(hajot). : Birayê wî firokevane. |
| **Firokevanî** | (karn.dar.mê) Karê hajotina firokeyan. |
| **Firokexane** | (hk.cih,n.dar.mê) Firîngeh. |
| **Firoşer** | (pî(n.dz) Kesê kelûpelan,fêqî û htd di firşit. Kesê karê firotinê dike. |
| **Firoşgeh** | (n.cih.mê) Dikana mezin. Cihê firotina kelûpelan, tiştan. |
| **Firoştin** | (k.jn.x.mê) Her tiştê(mitayê) beramber pareyî yan mitayekî bi dî yekî. (K) Bdn:ez di firoşim,em di firoşîm, tu difiroşî, hûn di firoşin, ew di froşe[..it] ewan di froşin. PR: Dê[bi] + Bdn. Bdb: Di firoşt, di firot, di firoştin.di firotin. Db,dûr: firoştibû,...bûn.(F): bi froşe, bifroşin. |
| **Firoşyar** | (pî(n.dar.dz) Firoşer. |
| **Firoşyarî** | (karn.dar.mê) Karê firotina kelûpelan. |
| **Firotin** | (k.jn.x.mê) Firoştin. |
| **Firşik** | (n.x.nêr) ***candar*** 1. Nermegoştê navbera zik û singê lawiran ji nav da. 2. Hêvênê penîrî ko ji hedamê lawiran çêkirî ye. |
| **Firşkbûn** | (k.jn.l.mê) Paş zayînê jibo cara yekê karik yan zaro şîrê dayk,maka xwe di xwe. :Bi şîrê makê firşik bû. (K) bn: Bûn. |
| **Firşikkirin** | (k.jn.l.mê) Êkem car şîrê makê di din karikan.Yekem car zaro şîrî di xon.(K) bn: Kirin. |
| **Firşikteng** | (hn.l.çewa) Bêhinteng. :Wey hewar çi jinkeka firşiktenge!. |
| **Firşteng** | (hn.l.çewa) Firşikteng. |
| **Firtine** | (n.x.mê) Hur. Bahoz. Babelîsk. |
| **Fis** | (n.x.mê) Bayî ji paşîya mirov û candaran di keve der. Derdikevit. Kuş. |
| **Fisandin**şk | .jn.dar.mê) 1. Ba jiber berdan. Pivdank fisand. 2.Perîna tewalan.Perîna çûçikan. Cotbûna tewalan. |
| **Fisgur** | (n.dar.mê) Core giyayek qehwayî ye, mêş û kêzikan di girit. |
| **Fisken** | (hk.l.çewa) Kesê ko fisan di ke. |
| **Fiskirin** | (k.jn.l.mê) Derêxistina bayê hinavan. Kuşkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Fisqe** | (n.x.mê) Pîvazên biçûk.Kixs. |
| **Fisteq** | (n.x.mê) ***darûbar*** 1. Dareka mîna dara keskannane fisteqan di girit. 2.Corek çerezane, tîvkilreqe, yan kakile. |
| **Fişandin** | (k.jn.x.mê) 1.Ba jiber berdan. Valakirin. Tepik fişand. 2. Kifkirin. 3.Xwarkirin. : Pişta kerî di bin barî ve fişand. |
| **Fişefiş** | (hn.dar.çewa) Dengê kifekifa difin û devan. |
| **Fişefişkirin** | (k.jn.gl.mê) Difinradan tanî deng jê bi hêt.Kifkirin. |
| **Fişkandin** | (k.jn.dar.mê) Derêxistin. Derkirin. |
| **Fişkilandin** | (k.jn.x.mê) Pirtikandin. |
| **Fişkilîn** | (k.jn.x.mê) Pirtikîn. Peritîn. |

| | |
|---|---|
| **Fiştiqandin** | (k.jn.dar.mê) Pûçkirin. Xirakirin. Aşkerakirin. Jinavbirin. |
| **Fiştiqîn** | (k.jn.x.mê) Pûçbûn. Xirabbûn. Herifîn. |
| **Fitare** | (n.biyan) Xwarina êkê ya şikandina rojîyê, li dema roj ava dibit. |
| **Fitarekirin** | (k.jn.l.mê) Xwarina fitarê. (K) bn: Kirin. |
| **Fîk** | (n.x.mê) ***deng*** Fît. |
| **Fîkan** | (n.x.mê) Fîtik. |
| **Fîkandin** | (k.jn.x.mê) Fîtikvedan. (K) bdn: ez di fîkînim em di fîkînîn, tu di fîkînî hûn di fîkînin, ew di fîkîne[…it] ewan di fîkînin. Pr: dê [bi]+ bdn. Bdb: di fîkand, di fîkandin. Db,dûr: fûkandibû. ….bûn. (F): bi fîkîne, bi fîkînin. |
| **Fîl** | (n.x.dz) ***candar*** Mezintirîn giyandarê şîrdere, liser erdîdi jît. :Fîlek mezin. :Limbîsê fîlî. |
| **Fîlim** | (n.byiyan) Film. |
| **Fîlter** | (n.biyan) Parzinînk. |
| **Fîncan** | (n.x.mê) Kopeke ji axa cerik yan şûşe hatîye çêkirin, bi reng û nîgaran xemilandî ye, mirov jibo pê vexwarina qehwe û çayê bi kar di hîne.***Pend*** :Vexwe heft fincanêd jehrê, ne vexwe fincaneka qehirê. |
| **Fînok** | (hn.x.çewa) Jinka yan zelamê pûç.Rispe. |
| **Fîrandin** | (k.jn.dar.mê) Fîtikvedan. (K) bdn: ez di fîrînim em di fîrînîn, tu di fîrînî hûn di fîrînin, ew di fîrîne[..it] ewan di fîrînin. Pr: dêbi +bdn. Bdb: di fîrand, di fîrandin.Db,dûr: fîrandibû,..fîrandibûn. (F): bi fîrîne, bi fîrînin. |
| **Fîre** | (n.x.mê) Zikçûn. Fîşk. |
| **Fîredan** | (k.jn.l.mê) Zikçûn. Bi fîşan kevtin. Hinavçûn. (K) bn:Dan. |
| **Fîrik** | (n.dar.mê) 1.Dengê fîtêna ji devî tê.2. Amêreke bi pifkirinê fîtên jê di hêt. |
| **Fîstan** | (n.dar.nêr) kirasê jina yê dirêj . |
| **Fîş** | (n.x.mê) Tiştê şil yê bi pest di çit wek zikçûnê. Fîşên wî di çin. |
| **Fîşeng** | (n.x.mê) Fişek. |
| **Fîşengbend** | (n.dar.nêr) Rextê fîşekan. |
| **Fîşek** | (n.x.mê) Guleyên tivengan. |
| **Fîşik** | (n.dar.mê) Fîş. |
| **Fîşikçûn** | (k.jn.l.mê) Zikçûna mirov û giyaneweran. Hinavçûn.bi Fîşikan kevtin. |
| **Fît** | (n.x.mê) 1.Dengê bi hêza paldana bayî ji lêvan peyda di bit. ***Pend***:Fita Hesedê hewêrî. Ang; karê ko gelek dirêj di bit.2. Peyt. Dirist. : Cilik yan her tiştê ji mirovî bi hêt. Ev kirase jibo te fîte.ang; jibo te yê diriste. |
| **Fîter** | (pîşn.dar.dz) Kesê alavên şikestî nûjen di ket. |
| **Fîterî** | (karn.dar.dn) Karê çêkirin û nûjenkirina amêran. |
| **Fîtik** | (n.dar.mê) *deng* Fît. |
| **Fîtikvedan** | (k.jn.l.mê) 1.Bi pifkirina bayî û gurckirina lêvan mirov dengê awazan ji devê xwe di hînin. 2.Pifkirin amêrê fîtikê tanî deng jê bi hêt. Fîkandin. (K) bn: Vedan.. |
| **Fîtkirin** | (k.jn.l.mê) 1. Nehêlan. Jinav birin. Çi ji ber xwarin û vexwarinê neman. :Zadê xo fît kir. Nanê xwe fît kirin.2. Fîtikvedan. (K) bn:Kirin. |
| **Fîxan** | (n.x.mê) Nalîn. Zêmar. Kovan. :Axînk rahêlan. Kovan ki(andin. |
| **Fîxankirin** | (k.jn.l.mê) Kovandarbûn. Xemxwarin. |

| | |
|---|---|
| **Fîzar** | (n.x.mê) Fîxan. |
| **Fîzarkirin** | (k.jn.l.mê) Axîn rahêlan. Xemxwarin. (K) bn:Kirin. |
| **Fîzîk** | (n.biyan) 1.Zanîna xuristî. Zanîna xwezayî. 2. Hêza laşî. |
| **Fîzîknas** | (pî(n.l.dz) Pispor di warê fîzîkê da. |
| **Fîzîknasî** | (n.biyan.l) Zanîna fîzyayê.Fîzîk. |
| **Fîzya** | (n.biyan) Fîzîk. |
| **Folklor** | (n.biyan) Rewişt,tîtal, cilik û kelûpelên kevnar yên gelêrî. Kelepor. |
| **Folklorî** | (hk.dar.çewa) Tiştêd folklorî. Kevin. Keleporî. |
| **Frans** | (cugirn) Welatê Firensa. |
| **Fransî** | (maln.n.dar)1. Xelik yan zimanê welatê frans. 2. Kelûpelên ji Fransa. |
| **Frêkirin** | (k.jn.dar.mê) Bi rê kirin. şandin. Rêkirin. Hinartin. |
| **Fus** | (n.x.mê) Fis. |
| **Fûtik** | (n.x.mê) Parçe perokeke bo nivêj li ser kirinê bi kar di hînin. şemilk. Cilnivêşk. |

# G

| | |
|---|---|
| **G** | (ge) Pîta nehê ji abeya kurdî. |
| **Ga** | (n.x.nêr) Giyandarek şîrdere, nêre, kehî yan kûvîye. ***Pend*** :Gayîcot ne kir mirêbayî minê kir.***Pend*** :Gayê kilik qut mêşa ji xwe na revînit.***Pend*** :Gayê nav golikane, ang; kesê karên zarokane bi ke.***Pend*** :Ga di ke, xwedî di xwe.***Pend*** :Gayê pîr hî nabit cotî. Ang; mejîyên kevneperist di gel serdemî narahên. ***Pend*** :Ji gayî guh nîşa da. Ang; kesê piranîya malê yekî ji xwe ra zep di ke û kêm di detê. ***Pend*** :Ne me ga li garanê, ne nob li gavanî.ang ; yê çi nebe, sergêjî û xem jî nebe.nabe. |
| **Gabarê** | (hk.cih.cugir,n.) Çend gundekin li Kurdistanê. |
| **Gabarî** | (malbat.n) Xelkê gundên gabarê. |
| **Gabinêzk** | (n.dar.mê) ***derd*** Êşeke stoyê mirovî rêncî[girj] di be, mirov nikare serê xwe bi bade. Xinzirîna stoyê mirovî. |
| **Gabinêzkgirtin** | (k.jn.gl.mê) Toşî derdê gabinêzkê bûn. Stoxinzirîn. Rastî gabinêzkê hatin. |
| **Gader** | (hkcih.cugirn) Çiyayeke li Kurdistanê. |
| **Gadêr** | (kar,n.dar.dz) Gavan. |
| **Gadêrî** | (karn.dar.dn) Gavanî. |
| **Gaj** | (n.x.mê) Gulolka bendikan. |
| **Gakêl** | (pî(n.dar.dz) 1. Cotyar. Cotkar.2. Gayê jibo kêlana zevîyan bi kar di hînin.Gayê cotî. |
| **Gakotir** | (n.l.dz) ***balinde*** Balindeyeke mîna kotirane. Gapil. |
| **Gakûvî** | (n.l.dz) ***candar*** Gayê kûvî. Gayê kwîvî. Bîzon. |
| **Galgalîsk** | (n.dar.mê) *giyandarzanî* Gerî. Gewrî. Gero.Gelalîşk. |
| **Galiske** | (n.x.mê) Erebeyeka teybetî ye, cihê rûniştina çend kesan di nav da heye, di xin dû hespan jibo veguhaztina mita yan mirovan. |
| **Galte** | (n.x.mê) Henek. Yarî. Gelte. Tirane. : Ew mirovek bi gelteye;ang tiranekere. |
| **Galtebêj** | (hk.dar.çewa) Tiraneker. |
| **Galteker** | (hk.l.çewa) Tiraneker.: Mirovê galteker. |
| **Galtekirin** | (k.jn.l.mê) Tiranekirin. Wî herdem galte di kirin. (K) bn: Kirin. |
| **Gamêş** | (n.x.dz) ***candar*** Giyandarek malî, şîrdere ji bira çevrîya ne. |
| **Gan** | (n.x.mê) Cotbûna navbera du giyandaran. Guhnelîya giyandaran. Kutan. |
| **Gander** | (hn.dar.çewa) Pûç. Rispe. |
| **Ganêr** | (n.dar.nêr) Gayê nêr. |
| **Gankirin** | (k.jn.l.mê) Kutan. Perîn.Cotbûn. (K) bn :Kirin. |
| **Gapîsk** | (n.l.nêr) Helameteke dema nivistinê mirov we hizir di ke ko xwe bi ser leşê mirovan da di girit û bêhna mirovî çik di bit. Dêvzime. |
| **Garan** | (n.dar.mê) Birek (komeka) çêl û ga, gareşan bi hevra li çerwanî. ***Pend*** :Çêleka tiro garanekê tiro di ket.ang ; kesekê ziyano, ziyanê di gehîne civakekê. |
| **Gare** | (hk.cih.cugirn.x.nê) 1. Çiyayeke li Kurdistana Iraqê.2. Navê xort û keçane. |

| | |
|---|---|
| **Gareş** | **(**n.l.dz) Çêl, gol û ga. Çevrî. |
| **Garis** | (n.x.nêr) *giya* Mitayek dindik hûre jibo xwarinê wek nan mifa jê di hat wergirtin û wek tomkê çûçikan bi kar dihêt.Pend :Garisî du rê bi stûnê ve di bet.ang ; mirovê zorzan. |
| **Garîte** | (n.x.nê) Darek dirêj û stûre bo ser avahîyan û karên din bi kar di hêt. |
| **Gasik** | (n.dar.mê) Pelgir. Gazik. |
| **Gasin** | (n.dar.nêr) Gêsin. |
| **Gav** | (n.x.mê) 1. Dûrîya navbera du pêyan dema rêveçûnê.2. Pêşkeftin.Pêşveçûn.3. Dem. : *pend* gava xudê da, na bêjit tu kurê kêyî?. Gava tu hatî, dê bi rê kevîn. |
| **Gavan** | (pîşn,dar.dz) Kesê di çit ber gareşan(çevrîyan). Sexbêrkerê garanê.***Pend*** : Faydê gavanî siwarbûna dewarane. |
| **Gavanî** | (karn.dar.mê) Karê ber dewaran. Çavdêrê dewar û çevrîyan. |
| **Gavanîkirin** | (k.jn.gl.mê) Dema mirovek karê çavdêrî ya gareş û dewaran di ke. :Wî heft salan gavanî kir. :Gavanîkirin karekê dijware. |
| **Gavavêtin** | (k.jn.l.mê) 1.Dema mirov bi rê di çe û gavan dihavêje.2. Pêşveçûn. Pêşdaçûn.3. Destpêkirin. :Me gav avêtine jibo avakirina dezgehekî. (K) bn: Avêtin. |
| **Gavber** | (hn.dar.çewa) Dijber. Dij. |
| **Gavdan** | (k.jn.l.mê) Bazdan. Bezîn. |
| **Gavhavêtin** | (k.jn.l.mê) Gavavêtin. (K) bn: Havêtin. |
| **Gavîn** | (n.dar.mê) Navbir. Vebir. Heyam. Navber. |
| **Gavkirin** | (k.jn.l.mê) ) Gavhavêtin. (K) bn: Kirin. |
| **Gawir** | (n.x.dz) Mirovê bê bawer, yê ji xudê netirs. Bêwijdan. |
| **Gaz** | (n.x.mê) 1.Madeyek sivike di nav bayî da, gelek cor hene mîna oksicîn, haydirocî, htd. 2. Gaza sotinê ya jibo karên gerimkirin û xwarin lênanê bi kar di hînin. |
| **Gazel** | (n.x.pir) Belgên zerên daran,li payîzê di werin. |
| **gazik** | (n.x.mê) 1. Berbiska bi rwîşîk.2. Amêrekê du deve jibo girtina pelên kuçik û tenûran bi kar di hînin. Pelgir. |
| **Gazind** | (n.x.mê) Gazinde. |
| **Gazinde** | (n.x.mê) Dema mirov ji karekî ne qayîl bit bi xwaze şaşîyên wî diyar bi ke rêya dirist nîşan de. Gilî.Rexne. Dalehî. |
| **Gazindekirin** | (k.jn.l.mê) Rexnegirtin. Gileyîkirin. Dalehîkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Gazinok** | (hk.dar.çewa) Mirovê pir gazindan di ke. Pitpitî. |
| **Gazî** | (n.x.mê) Bang. Hewar.Dengê mirovî. : *pend* Gazîya dûv gurî, ang; dema kar ji destê mirovî der di kevit û êdî hindî hewar bi kî na zivirit. |
| **Gazîker** | (n.dar.dz) Kesê gazî di ke. |
| **Gazîkirin** | (k.jn.l.mê)1. Bangkirin. Daxazkirin.(k) bn :Kirin. |
| **Gazîvan** | (n.dar.dz) Gazîker. |
| **Geç** | (n.x.mê) Gêç. |
| **Geda** | (hn.x.çewa) Hejar. Nedar. |

| | |
|---|---|
| **Gedandin** | (k.jn.dar.mê) Destê xwe li ber xelkî ragirtin jibo alîkarîyê. Xwaztin. Xazokîkirin. (K) Bi gedîne, di gedînîn, gedînin. Di gedand. |
| **Gede** | (n.x.nê) ***leş*** Hedamê hêrana xwarinê. Zik. Berkurk. Bertûrk. |
| **Gef** | (n.x.mê) Gotineke dijî mirovekî di hêt kirin bi kiryararek êşandin yan lêdana gurzekî. |
| **Gefandin** | (k.jn.x.mê) Gefkirin. (K) bdn: ez di gefînim em di gefînîn, tu di gefînî hûn di gefînin, ew di gefîne[...it] ewan di gefînin. Pr: dê[bi]+bdn. Bdb: di gefand, di gefandin.Db,dûr: gefandibû, gefandibûn. (F) : bi gefîne, bi gefînin. |
| **Gefkirin** | (k.jn.l.mê) Kirina gefan dijî kesekî. : Wî gefa kujtinê li hevdijê xwe kirîye, eger pareyên wî ne zivrînit. |
| **Geh** 1 | (n.x.mê) *leş* Cihê êkgirtina du serên hestîyan. Girê. :Janek kevtîye gehên destên min. |
| **Geh** 2 | (n.x.mê) Car. Carcar. Dem. Gav. :Vê gehê ne êka dî dê hêm. |
| **Geh** 3 | (n.x.nêr) ***kevin*** Paşgireke bi peyvê ve di mîne ramana cih dide; wek bingeh, dezgeh, xwaringeh û hw. Cih. |
| **Gehandin** | (k.jn.dar.mê) Dema mirov yekî, tiştekî ji cihekî bo yê din bi gehîne. : Bê zehmet van zaroyan di gel xwe bi gehîne xwendingehê. (K) Bdn: ez di gehînim, em di gehînîn, tu digehînî hûn di gehînin, ew di gehîne[..it] ewan di gehînin. PR: dê[bi]+ bdn. Bdb: di gehand, di gehandin. Db,dûr: Gehandibû,… bûn. (F): bi gehîne, bi gehînin. |
| **Gehçûn** | ji gehçûn (k.jn.l.mê) Dema geha hestî ji cihê xwe diçit ji egera ketin yan hilgirtina tiştê giran. : Çoka min ji geh çûye.(K) bn : Çûn. |
| **Gehiştin** | (k.jmê) 1.Dema tiştek di gehit wek fêqê yan mirov mezindi bit. 2.Tiştek yan kesek di gehit cihê pêdvî. Gehîn. |
| **Gehîn** | (k.jn.x.mê) Gehiştin. (K) : Bdn: ez di gehim em di gehîn, tu di gehî hûn di gehin, ew digehe[…it ]ewan di gehin. PR: dê[bi]+ Bdn. Bdb: Gehişt, gehiştin. Db,dûr : gehiştibûm,…bû, bûyn, bû..bûy. … bûn. (F) : bi gehe bi gehin. |
| **Gehkurt** | (hn.l.çewa) Mirovê hedamên canê wî di kurt bin. |
| **Gejgerînk** | (n.dar.mê) Babelîsk. Zivroka bay. |
| **Gejmirandin** | (k.jn.dar.mê) Gemirandin. |
| **Gel** | (n.x.dz) 1.Bireka mirovan yek ziman, ax û tîtal hebin. Netewe.:Gelê kurd. :Gelê faris, htd.2. Deste. Bir. Kom. |
| **Gela** | (n.x) *darûbar* Belg. |
| **Gelale** | (n.x.mê) Reşnivîs. Mijar. |
| **Gelalîşk** | (n.x.mê) Gerî. Gero. Gewrî. Hefk. |
| **Gelavêj** | (n.x.mê) ***stêr*** Gilavêj. |
| **Gelejimêr** | (hk.l.çend) *rêzman* Pir. Gelek. Ji gelek hijmaran pêk hatîye. |
| **Gelek** | (hk.çend) Pir. Zor. : *pend* Gelek nede ber dasê da ne mînit asê. ***Pend*** :Gelek gotin dilsotin. ***Pend*** :Gelek bizane kêm bi axive. ***Pend***:Ji gelekan gelek di çin, ji piçekan piçek.ang; dema ziyan di gehe mirovê zengîn yan malbata pir mirov pir mirov û malê wan di çe û yên destkurt û kêm mirov ziyana wan ya kême. |

| | |
|---|---|
| **Gelemper** | (n.dar) Civak. Komel. |
| **Gelemperî** | (hn. Dar.çewa) Giştî. Bi giştî. Civakî. Tebayî. |
| **Gelêrî** | (hn.dar.çewa) Tiştê keleporî , huner, sitran, cil, htd. Gelî. |
| **Gelî** 1 | (hk.cih.cugirn.x.mê) Navbera du çiyan, giran. : Gelîyê Duhok, Zaxo, Zîlan û htd. |
| **Gelî** 2 | (hn.çewa) Gelêrî. |
| **Gelmiçandin** | (k.jn.dar.mê) Germişandin. |
| **Gelmişandin** | (k.jn.dar.mê) Perçiqandin û têkhelkirin. |
| **Gelnas** | (hn.l.çewa) Dilsoj û xebatker ji pêxemet gel û welatê xwe. Welatparêz. |
| **Gelo** | (pêrb.alv.bangkirin) ***rêzman*** Alaveke jibo gazîkirin û hişyarkirin bi kar tê.: Gelo ma ta kengî em dê bindest mînîn?. |
| **Gelte** | (n.x.mê) Tirane . Henek. Yarî. |
| **Gelviçandin** | (k.jn.dar.mê) Perçiqandin. Pankirin. |
| **Gelwaz** | (hn.çewa,n.dar.mê) Gulwaz. Gilwaz.Qeft. |
| **Gemar** | (hn.x.çewa) Tiştê rizî, genî û pîs.Qirêj. :Ava gemar. Xwarina gemar. Mirovê gemar. |
| **Gemarbûn** | (k.jn.l.mê) Pîsbûn. Qirîjîbûn. |
| **Gemardan** | (k.jn.l.mê) Dorpêçkirin. Abloqedan. |
| **Gemarî** | (n.dar.mê) Pîsî. Qirêj. |
| **Gemarkirin** | (k.jn.l.mê) Pîskirin. Qirêjîkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Gemaro** | (n.dar.mê) Dorpêç. |
| **Gemarodan** | (k.jn.l.mê) Dorpêçkirin. (K) bn: Dan. |
| **Gembol** | (n.dar.nêr) Segê nêr. Se. |
| **Gemirandin** | (k.jn.x.mê) Vemalîn yan perixandina leşê mirovî. (K) bdn: ez di gemirînin em di gemirînîn, tu di gemirînî hûn digemirînin, ew di gmirîne[..it] ewan di gemirînin. PR: dê bi +bdn. Bdb: di gemirand, di gemirandin. DB,dûr; gemirandibû, …bûn.(F): bi gemirîne, bi gemirînin. |
| **Gemî** | (n.x.mê) Amêrekê bi hêza bay, zendik yan şewatekê kar dike, jibo veguhaztina mirov û kelûpelane di avê da mifa jê di hêt wergirtin. Belem. Papor. Keştî. |
| **Gemîvnan** | (pîşn.dar.dz) Kesê gemîyî di hajot. Xwedîyê gemîyê. |
| **Gemîvanî** | (kar.dar.mê) Karê hajotin û sexbêrkirina gemîyan. |
| **Gemjo** | (hn.x.çewa) Mmirovê qelew gêj û tembel. Çêlo. |
| **Gemşo** | (hn.x.çewa) bn:Gemjo. |
| **Genc** | (hn.x.çewa) Law. Xort. Cihêl . Tolaz. Nestêl. Azad hêj gence. |
| **Gencîne** | (n.x.mê) Xizîne. Defîne. |
| **Gencînî** | . (n.dar.mê) Lawînî. Cihêlî. :Gencînî ya hemû li biyanîyê derbaz bû. |
| **Gendel** | (hk.x.çewa) 1. Mirovê pere û dahatê dezgeh, kargeh welat û htd jibo xwe di dzit. 2. Navê mêrane. |
| **Gendelî** | (n.dar.mê) Dema ajawe, berelayî û qetlazî di kevit nav civakekê da, ko pere jibo meremên kesatî bi hên bi kar anîn, çi nêrevanî liser ne be. |
| **Gendij** | (hn.dar.çewa) Kesê bêhna gemar jê di hêt. Genî. |

| | |
|---|---|
| **Gengeşe** | (n.dar.mê) Hevrikî. Miştomir. Danûstandin. :Ez dixwazim bizanim gengeşeya hewe li ser çiye ?. |
| **Gengeşekirin** | (k.jn.l.mê) Cirekirin. Hevrikîkirin. |
| **Genim** | (n.x.nêr) Mitayek çandinî ye, dindika wî wek savar, danqut, danhêr di jibo xwarinê bi kar dihê û nanî jê çê di ken. ***Pend*** : Genim nebî, ceh be, ceh nebî têkel be.***Pend*** :Nanê genimîye bi her zadî tê xwarin.ang ; mirovê çak yan amêrê desthil jibo her karî mifa jê di hêt wergirtin. |
| **Genimî** | (hn.dar.çewa) Rengê mîna genimî.:Pora wê genimî ye. |
| **Genimşam** | (n.l.nêr) Genmok. Jagenim. Genimşa |
| **Genî** | (rd.x.çewa) Gemar. Herimî. :Mirovê genî. :Jajîyê genî. :Hêka genî. |
| **Genîbûn** | (k.jn.l.mê) Gemarbûn . pîsbûn. Rizîn. Rizîbûn. :Zadê liber tavê mayî genî bi bû. |
| **Genîkirin** | (k.jn.l.mê) Pîskirin. Rizîkirin. |
| **Genmok** | (n.dar.nêr) Genimşam. |
| **Genû** | (n.x.nêr, hn.x.çewa) Genî. |
| **Gep** | (n.x.mê) Rû. Gone. |
| **Ger** 1 | (hk.cih.n.x.mê) Cihê av lê pengî, kombûy. Gol. : Gelek masîyên di gerê da. :Xwe havêt gerê. |
| **Ger** 2 | (pêrb) ***rêzman*** Alavê mercê. Ang; eger.:Ger min bi zanîya tu dê wesa bi kî..?.:Ger ez çûm bajêrî, dê ji te ra tembûrekê bi kirim. |
| **Ger** 3 | (n.x.mê) Dor. :Tu here paşî gera mine. :Gereka dî ez dê xwarinê lênim. |
| **Geran** | (k.jn.x.mê) Hatinûçûn . Piyase. Geryan : ***Pend*** :Geryane, diryane. (K) Bdn: ez di gerin em di gerîn, tu di gerî hûn di gerin, ew di gere[…it] ewan di gerin.PR: dê [bi]+ bdn. Bdb: di geram, di gerayn, geray, di gera ,di geran. Db,dûr: Gera[gerya] bûm, bûyn(bûn),..bûy(bû)…bû.. bûn.(F): bi gere bigerin. |
| **Gerandin** | (k.jn.x.mê) Gêrandin. Mirov yekî bi gerîne. . : *Pend* Jina minê, were pişta minê, da te bi gerînim li dinê. Dayka minê bela serê minê. (K) Bdn: ez di gerînim em di gerînî, tu di gerînî hûn di gerînin, ew di gerîne[…it] ewan di gerînin.. PR: dê [bi] + bdn. Bdb: di gerand, di gerandin. Db,dûr : gerandbû,…bûn.: (F) : bi gerîne, bi gerînin |
| **Gerav** | (n.dar.mê) Girav. Pengav. |
| **Gerdelûle** | (n.x.mê) Babelîsk. |
| **Gerden** | (n.x.mê) *leş [can]* Pirteka leşê mirovî ye ,ji bin erzinkê ta singî .Hefik. |
| **Gerdenaza** | (hn.l.çewa) Mirovê hatî aza kirin ji şaşîyan. Azad. Serbest. |
| **Gerdenazakirin** | (k.jn.l.mê) Lêbihorîn. Azakirin. Lê xweşbûn. : Heger min dilê te hêla bit, hîvîye gerdena min aza ke. (K) bn : Kirin. |
| **Gerdenbend** | (n.l.mê) Ristik.Stovank. |
| **Gerdengaz** | (hn.l.çew.çewa) Mirovê, nexasime jina gerdena wê dirêr û ciwan. |
| **Gerdenî** | (n.dar.mê) Stovank. Ristik. |
| **Gerdenkêl** | (hn.l.çewa) Jina gerdena wê mîna kêlê ciwan û diyar. |
| **Gerdenzer** | (hn.l.çewa) Xudana gerdena zer û xweşik. |

| | |
|---|---|
| **Gerdûn** | (hk.cih.cugirn.x.mê) Cîhan. Dinya. Topa erdî. : *helbest* Min dî alema kelamê mewzûn , alî bi kira ji bane gerdûn.Helbestvan ; A.Xanî. |
| **Gerdûnî** | (hn.dar.çewa) Cîhanî. Valayî. : Heyva gerdûnî. |
| **Gereke** | (pêrb) ***rêzman*** Pêdvîye. |
| **Gerew** | (n.x.mê) Barimte. Li cihê êkî. Pêş yekî ve. : Birayê te di gerewa te da çû. |
| **Gerewdan** | (k.jn.l.mê) Mirov pare, yan malî li pêş yekî ve bi de da bi hêt azadkirin,çi ew kes yê girtî bit yan karek ne rê dijî yekî encam da bit. |
| **Gerewkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov bi barimte bi hêt girtingirtin. |
| **Gerger** | (n.dar.nêr) Cercîr. Cehcîr. |
| **Gergerok** | (hk.dar.çewa) Gerok. |
| **Gergûnk** | (n.dar.mê) Stovan. Ristik. |
| **Gerik** | (n.x.mê) 1.Tovê gul û giyayî yê hûrik mîna tozê.2. Toza havînan liser belgên daran di nîşit. 3. Gera avê a biçûk. |
| **Gerim** | (n.x.mê,,hn.çewa)1.Pileyeka bilind. Havîna gerim. Germa agirî. Evro rojeka çewane?.; rojeka gerime.2. Çeleng. Çespan. : Mirovekê gerime. :Berîka wî ya gerime. Ava gerim. Xwarina gerim. BRX Sar. |
| **Gerimbûn** | (k.jn.l.mê) Bilindbûna pileyên gerimê. Av li be tavê gerim di be. Havînê dinya gerime. (K) : Bûn. |
| **Gerimkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov pileya gerima tiştekî bilind bi ke. : Avê gerim bi ke. Çayê gerim bike. (K) bn: Kirin. |
| **Gerimkirî** | (hk.l.çewa) Hatî gerim kirin. Ava gerimkirî. Jîrê gerimkirî. |
| **Gerisandin** | (k.jn.x.mê) Dema mirov xwe li êkî bi dit, bêxit erdî û kelexê wî werbadet û bi gevizînit. (K) Bdn: ez di gerisînim em di gerisînîn, tu di gerisînî hûn di gerisînin. PR: dê[bi] + bdn. Bdb: di gerisand, di gerisandin. Db,dûr: gerisandibû, …. bûn. (F) : bi gerisîne, bi gerisînin. |
| **Gerîh** | (hn.x.çewa) Bahîva ne gehiştî. Bahîvterk. |
| **Gerîla** | (n.dar.dz) Gerok. |
| **Gerîn** | (k.jn.x.mê) 1.Geryan. 2. Gerandin.3. Jêvebûn. Bela xwe lêdan.: Ez ji te nagerim ta perên min ne dî. Ji min bi gere. |
| **Germ** | (n.x.mê, hn.çewa) Gerim. |
| **Germandin** | (k.jn.dar.mê) Kerimkirin. |
| **Germav** | (n.l.mê) 1.Kanîyên ava wan gerim. 2. Serşo. |
| **Germavî** | (n.l.dz,hn.çewa) Mirov, xasim jin yêd di çin gemavê jibo şoştina cilik û seran. Balavî. |
| **Germavxweş** | (silav.pîroz) Dema êk serê xwe di şot, pîrozîyê lê di kin û jêra di bêjin ;germavxweş. Noşêcan be. |
| **Germhijmêr** | (n.l.mê) Amêrê pîvana pileyêd germê. |
| **Germijandin** | (k.jn.dar.mê) Gerimkirin. |
| **Germijîn** | (k.jn.x.mê) Gerimbûn. Gelek gerimbûn. |
| **Germijok** | (n.dar.mê) Dema canê mirovî li ber germê di şewite. Tavbirin. Tawî. Tavî. |
| **Germik** | (n.dar.mê) 1.Patekê gerimkirî di danin ser laşê mirovê westayî dako giyanê wî nerim bi bit. 2. Germav. |

| | |
|---|---|
| **Germikdan** | (k.jn.gl.mê) Germik li ser erdê westayî û girj di danin dako nerim û tena bi be. : :Wî zendika xwe ya perçivî û şînbûyî germik da.(K) bn:Dan. |
| **Germişk** | (n.dar.pir) Ji egera tava dujwar a havînê, coreke pirsikê |
| | horik li canê mirovî di hên. |
| **Germixandin** | (k.jn.dar.mê) Gerimkirin û zuhakirina tiştî binixavtinê.(K)bdn: ez di germixînim em di germixînîn, tu digermixînî hûn di germixînin, ew di germixîne[…it] ewan digermixînin. Pr: dêbi + bdn. Bdb : di germixand, di germixandin. Db,dûr: germixadibû, germixandibûn. (F): bi germixîne, bigermixînin. |
| **Germixîn** | (k.jn.x.mê) Liber tava rojê, yan li ber germê fêqî, zad,vexwarin gerim di bin di rizin. |
| **Germiyan** | (hk.cih.cugirn.dar) Cihên gerim , nemaze li dema zivistan û biharan. BRX Zozan. |
| **Germî** | (hn.dar.çewa) Bilinbûna pileyan .Gerim. :Germîya leş. |
| **Germîdan** | (k.jn.lmê) Cih yan tiştê ko germa jê peyda di be.: Ev sopeye çi germîyê nade?.(K) bn: Dan. |
| **Germjimêr** | (n.l.mê) Gerhijmêr. |
| **Gernas** | (hn.dar.çewa) Mêrxaz. Qehreman. Mêrçak. |
| **Gerok** | ( hk.dar.çewa) 1.Mirovê li welat û cihan di gerit jibo lêkolînan.2. Kesê pir di gere. |
| **Gerû** | (n.x.mê) Gewrî. Gerî. |
| **Geryan** | (k.jn.x.mê) Geran. |
| **Gesik** | (n.x.nêr) Gêzik. |
| **Gestin** | (k.jn.x.mê) Geztin. |
| **Geş** | (hn.x.çewa)1.Ronî. Bi ronahî. : Heyva geş, lempa geş, çirayê geş û htd. 2. Vebûyî. Vekirî. : Gula geş Çavên geşDilê geş û htd. BRX Tarî .Çirmisî. |
| **Geşbûn** | (k.jn.l.mê) 1.Vebûn. :Jiber avdanê gulêd baxê me geş bûn. 2. Xweşbûn .Ronîbûn. Bişkurîn :Bi hatina te em pir geş dibîn.(K) bn : Bûn. |
| **Geşî** | (n.dar.mê) Ronahî. Vebûn. |
| **Geşkirin** | (k.jn.l.mê) Ronkirin. Vekirin. (K) bn : Kirin. |
| **Gevaztin** | (k.jn.dar.mê) Gevizandin. |
| **Gever** | (devern.mê) Devereke li Kurdistana bakûr. |
| **Gevez** | (hn.x.çewa) Pora sor. Pirça sor. |
| **Gevil** | (hn.x.çewa) Bilîmet. Behredar. Bevil. |
| **Gevizandin** | (k.jn.dar.mê) Di tozê,axê werkirin. Di tozê vedan. (K): [di,dê] gevizînim, gevizînîn,gevizînî, gevizînin, gevizîne[…it], gevizînin. Bi gevizîne, bi gevizînin. Gevizand, gevizandin. |
| **Gevizîn** | (k.jn.x.mê) Canewer ji ber xurandina leşî, xwe di nav toz, ax, yan xîzî da dirêj di kin û hemû canê xwe wer di gêrin. Xwe di gevêzin. |
| **Gevizk** | (n.x.nêr) Cihê bi toz û xîz, giyandar bi taybet dewar xwe lê di gevizînin. Tozgevisk. |
| **Gevjo** | (hn.dr.çewa) Mirovê pora wî bê serûber û ne çêkirî. Sergij. Sergijavij. |
| **Gewc** | (hn.x.çewa) Bêmejî. Dîn. Aqilsivik. Xişîm. |

| | |
|---|---|
| **Gewçe** | (hn.x.çew) Lewçe. |
| **Gewerbûn** | (k.jn.l.mê) Mirina giyandaran. Sekitîn. Mirarbûn. : Kerê melayê gund yê gewer bûy. (K) bn: Bûn. |
| **Gewir** | (hn.çewa) 1.Rengê sipîyê tarî.2. Zîrek .Peyt. Rind. |
| **Gewixandin** | (k.jn.dar.mê) Desthefkê danan. Xeniqandin. (K) bdn: ez di gewixînim em di gewixînîn tu di gewixînî hûn di gewixînin, ew di gewixîne[…it] ewan di gewixînin. Pr: dê bi+bdn. Bdb : di gewixand, di gewixandin.Db,dûr: gewixandibû,… bûn. |
| **Gewlaz** | (n.x.nêr) Hevsarê dewaran. |
| **Gewr** | (hn.x.çewa) Rengê gewir. |
| **Gewre** | (hn.x.çewa) Mezin. Pir mezin. |
| **Gewrê** | (gazn. mê) Pejin,bangkirin û naznav ên jina gewir, ciwan. |
| **Gewrik** 1 | (hn.dar.çewa) Rengêd reş û sipî têkel.Boz. |
| **Gewrik** 2 | (n.x.nêr) Kevişk. |
| **Gewro** | (ngaz.nêr) Pejin, bangkirin û naznav yên mêrê gewir. |
| **Geyîştin** | (k.jn.x) Gehiştin. |
| **Gez** 1 | (n.x.mê) Core tiraşeke(dar) kesk û bêhinxweşe. |
| **Gez** 2 | (n.x.mê) Yekyeke bo pîvana dirêjîyê bi kar di hêt, mîna perokan. ***Pend*** :Gez û cew di destî da ne;ang; hemû biryar û ferman di destî da ne. :Wî du gezên peroka kirîn. Çaleka deh gezan kûr di hewşê da ye. |
| **Gez** 3 | (n.x.mê) Leqa mirovan,adî, pêşikan û htd. : *pend* Mar gestî ji werîsî di tirsit. |
| **Gezandin** | (k.jn.x.mê) Gezkirin. Sotin. : Xwarina tîj ezman gezand. |
| **Gezgezînk** | (n.dar.mê) ***giya*** Gezînk. |
| **Gezîn** 1 | (k.jn.x.mê) Dema tav gerim di bit bi çavan livînek tê dîtin. Tav di gezit. |
| **Gezîn** 2 | (k.jn.x.mê) Gestin. Geztin. Cotin. Jewitî. Jan. |
| **Gezînk** | (n.dar.mê) *giya* Core giyayekê keske leşê mirovî di gezîne. |
| **Gezkirin** | (k.jn.l.mê) Leqdan. Leqdanan. Pêvedan. : Zarokî tibila babê xo gez kir. (K) bn: Kirin. |
| **Geznex** | (malb.n.x) Hozeka kurdên felene ji gundê geznex li Kurdistana Turkî hatîn Kurdistana Iraqê li devera Silêvane xwecih bûne. |
| **Gezo** | (n.x.mê) 1.Jirînîyeke di kevit ser belgên daran.2. Core şekrokeke. |
| **Gezok** | (n.dar.mê) ***giya*** Gezînk. |
| **Geztin** | (k.jn.x.mê) Gestin. Leqdan. Tamkirin. |
| **Gêç** | (n.x.mê) 1.Corek axa sipî ye jibo avahîyan bi kar di hêt.:Dîwarê mala me gêçe. 2. Tebaşîr. |
| **Gêçkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov avahî, xanî yan dîwarkî bi gêçê di xemlîne. :We xanîyê xwe gêç kir?. (K) bn: Kirin. |
| **Gêj** | (hn.x.çewa) Mirovê hay ji xwe ne bit û tiştî ji bîr bi kit. Gêl. |
| **Gêjbûn** | (k.jn.l.mê) Wekî mirov gêj di be. : Heger ez zadî ne xom, ez gêj di bim. :Jiber bêhna dermanan gêj bû. (K) bn: Bûn. |
| **Gêjelok** | (n.dar.mê) Lîstokeke zaro di dora xwe da di zivirin tanî gêj di bin. |
| **Gêjî** | (n.dar.mê) Nexweşîya gêjbûnê. Gêjbûn. : Gêjîya wî ji nexwarinê ye. |

| | |
|---|---|
| **Gêjînk** | (n.x.mê) *giya* Core giyayke kûvîye, di hêt xwarin, tam tîje. |
| **Gêjkirin** | (k.jn.l.mê) Dema mirovek, hêzek bi be egra gêjbûna êkî. : |
| | Hindî tu di axivî te ez gêj kirim. Îro me xwe bi geryanê gêj kir.(K) bn: Kirin. |
| **Gêjnok** | (n.x.mê) Gêjînk. |
| **Gêl** | (hn.x.çewa) Gêj. |
| **Gêlas** | (n.x.mê) *fêqî* Core fêqîyeke şirîne wek helhelokane, gelek reng hene. |
| **Gêle** | (n.x.mê) Mêrî. |
| **Gêleşok** | (n.dar.mê) Dengûdor. Qerebalix. |
| **Gêlexur** | (n.dar.mê) Kunmêrî. |
| **Gêlme** | (n.x.mê) Têkelkirina gelek corên xwarinan. ***Pend*** :Gêlma gavanî.ang: jibo tiştê têkel û di nav êk ra di bêjin. Zadê têkel yê gavanî. Ji ber ko gavan xwarina xwe ji malên gundîyan werdigirin û di kene di êk amanî da. |
| **Gêran** | (k.jn.x.mê) Belavkirin yan pişkkirina tiştekî li ser xelkî.:Çayê di gêrînit ang; di det xelkî, mêvanan.Çavan di gêrînit , temaşa di ke. (K): Bdn: ez di[ gêrînim em gêrînin, tu gêrînî hûn gêrînin, ew gêrîne[..it]ewan gêrînin]. PR: dê[bi] + bdn. Bdb: digêrand, di gêrandin. Db, dûr: gêrandibû, …bûn. (F): bi gêrîne bigêrînin. |
| **Gêrav** | (hn.x.çewa) Çavlêkirin. Zarvekirin. |
| **Gêravkirin** | (k.jn.lmê) 1.Zarvekirin. Çavlêkirin. :Ew gêrava bavê xwe di ke. 2. Sextekirin. Wî di xwast nasnameyekê gêrav bike.[ango mîna wê çêke.] (K) bn: Kirin. |
| **Gêraz** | (n.x.mê) *fêqî* Gêlas. |
| **Gêre** | (n.x.mê,hn.çewa) 1.Dewaran ber di din ser qeselê dako hûr bi bit, jibo cudakirina dan û kayê. 2. Tiştek peyt û bê kêmasî bit. : Kar çewan bi rêve di çe? … Gêreye. |
| **Gêrekirin** | (k.jn.l.mê) Qutan û hûrikkirina qeselê dema dewaran li ser di gerînin (K) bn: Kirin. |
| **Gêrekirî** | (hk.l.çewa) Qesela yan pûşê hatî gêrekirin. |
| **Gêrik** | (n.x.mê) ***candar*** Coreke mêrîyane di hûrikin.Morîyên piçûk.Mêrîk. |
| **Gêrûse** | (n.x.nêr) Distar. Destar. |
| **Gêsin** | (n.x.nê) Asineke bi serê hincarî ve ye, sertîje jibo kêlana zevîyan, erdî bi kar di hêt.: Gêsinê, terektir yan dewaran. |
| **Gêsinkirin** | (k.jn.l.mê) Kêlana zevîyan bi gêsinî. :Cotkar zevî gêsin kir. (K) bn: Kirin. |
| **Gêsinlêdan** | (k.jn.gl.mê) Gêsinkirin. :Gêsinek li zevîya xwe da. |
| **Gêwil** | (n.x.nêr) Hizir û viyana mirovî jibo encamdan yan ne encamdana karî.:Bela xwe ji min veke min gêwilê te nîne!. :Te gêwil heye em piçek derkevin?. |
| **Gêwildar** | (hk.dar.çewa) Mirovê bi keyf. Mirovê gêwil hebe jibo kirina karekî. Bi gêwil. |
| **Gêwilsarbûn** | (k.jn.l.mê) Dil ji karekî sar bûn. Bêgêwilî. |
| **Gêwilsarî** | (n.l.mê) Bêgêwilî. |
| **Gêwilsarkirin** | (k.jn.l.mê) Dilsarkirin ji karekî. :Çi caran gêwilê xo ji xwandinê sar neke. (K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Gêwilşikandin** | (k.jn.l.mê) Bêgêwil kirin. Dilsarkirin. Deqşikandin.:Gêwilê min yê ji hajotina tirombêlan şikestî. |
| **Gêwilşkên** | (hk.l.çewa) Kesê şeqilşikên. Mirovê deqşikên. :Tu mirovekê gêwilşikênî û dilê mirovî ji her tiştî sar di key. |
| **Gêwlê** | (hk.lçewa) Jina karî li gor gêwlê di ke. |
| **Gêwlo** | (hk.dar.çewa) Mirovê her gavekê xwe di gihorit, car bi gêwil car bê gêwile.: Nojdar mirovek gêwloye, bi xwe nizanit wî çi di vêt!. |
| **Gêzer** | giyayê zer(n.dar.mê) *çandin* Giyeke riha wî ya zere û têt xwarin dermanê çavane ji ber vîtan A têda heye. |
| **Gêzik** | (n.x.nêr) Dav ,zil, şivik yan davên naylonî wek destik pêçayî, yan jî kirîne firçe jibo malîn û paqijkirina mal yan kolanan. :Gêzikê karebê. Gêzike yê bi karebê kar di ke û toz qirêjê di mêje.Sinik. Havlêk. |
| **Gêzikdan** 1 | (k.jn.l.mê) Malîn bi gêzikî. :Here gêzikekî li malê bide ya pîse. (K) bn:Dan. |
| **Gêzikdan** 2 | (n.dar.mê) Cihê gêzikî lê di hilgirin. :Gêzik li kîrêye. Di gêzikdanê da ye. |
| **Gêzikkirin** | (k.jn.l.mê) Malîn bi gêzikî. Gêzikdan. (K) bn:Kirin. |
| **Gêzirandin** | (k.jn.x.mê) Gîrokirin. Faşkirin. Serdabirin. (K)bdn: ezdi gêzirînim em di gêzirînîn, tu di gêzirînî hûn di gêzirînin, ewdi gêzirîne[…it] ewan di gêzirînin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : di gêzirand, di gêzirandin. Db,dûr: Gêzirandibû, ..bûn. (F): bigêzirîne, bi gêzirînin. |
| **Gicgicandin** | (k.jn.dar.mê) File; Filqandin. Hijandin. Zirziqandin. : Dermanî bi gicgicîne paş bi de zarokî.(K) bdn: ez di gicgicînim em di gicgicînîn, tu di gicgicînî hûn di gicgicînin, ew di gicgicîne[...it] ewan di gicgicînin.PR:dêbi +bdn. Bdb: di gicgicand, di gicgicandin. |
| **Gid** | (n.x.dz) Jibo nazandina karikan bi kar di hêt. (mê)Gidê..(nêr)Gido. |
| **Gidik** | (n.dar.dz) Karik. Gid. |
| **Gidî** | (hn.x.çewa) 1.Xort. Xorto.2. Bê bawer. Bê wefa. |
| **Gidîş** | (n.x.mê)1 Komek qesela genim, ceh yan danên dî ye bi şêweyek lakêşe yan çargoşe çêkirîye,liser yek hatîye danan paş dirûnê jibo ko hişk bi be bi kêrê cencerkirinê were. |
| **Gidok** | (n.x.nêr) *erd* Girik. |
| **Gidûk** | (n.x.nêr) Girdok. Girik. |
| **Gidyan** | (hnal.nê) 1. Gidî 2. Navê mêrane. |
| **Giftûgo** | (n.dar.mê) Gengeşe. Danûsitandin.Miştûmir. |
| **Giftûgokirin** | (k.jn.l.mê) Danûsitandin.(K) bn: Kirin. |
| **Gihan** | (k.jn.x.mê) Gehiştin. Gehan. |
| **Gihandin** | (k.jn.dar.mê) Gehandin. |
| **Gihar** | (n.x.nêr) Deravê avê yê tenik. Bor. : Li giharê derbaz bûm. |
| **Gihîşk** | (n.x.mê) ***fêqî*** Fêqîyek kîvî ye, piranî di reng zerin, xir û tam şirînin. |
| **Gihorîn** | (k.jn.x.mê) Wergitina tiştekî hember yê dî. Li hev guhartin. (K)bn: Guhartin. |
| **Gij** | (hk.cih..x.çewa) Cihê pir tefşeber û kevirên tîj. |
| **Gijavij** | (hn.dar.çews) Pora jiberêk çûyî û ne şekirî. :Mirovek ser gijavij. |

| | |
|---|---|
| **Gijeber** | (hk.cih..l..mêr) Cihek , zevîyek pir ji berêd gij.Gelek berêd gij di nav êk ra hebin. |
| **Gijên** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengê baran û gijikê. :Gijêna baranê. |
| **Gijênhatin** | (k.jn.l.mê) Bihîstan dengê gijêna baran û gijlokê.:Gijêna dengê gijikê di hêt. |
| **Gijgij** | (n.l.mê) ***deng*** 1. Dengê pêjna giyandaran demê di nav pîş û pelexî da di livin .:Gijgija pêyên wî ya di hêt.2. Dengê gijênabaranê. |
| **Gijgijandin** | (k.jn.dar.mê) Hejandin. Leqandin. |
| **Gijik** | (n.x.mê) 1. Dilopên baranê yên pir tezî û di bin qerîse û dibarin. 2. Por. Pirç. :Ezê gijika te bi girim. |
| **Gijlok** | (n.x.mê) Gijik. |
| **Gijnîj** | (n.x.mê) ***çandin, giya*** Giyayeke tovê wî biçûk û xire bêhxweşe piştî qutanê, arê wî bo nav nanî nav xarinên dî mifa jê tê wergirtin. :Sawikêd gijnîjan. |
| **Gijnîk** | (n.x.mê) *candar* Kirnî. |
| **Gil** | (n.x.mê) *erd* Ax.Teqin. |
| **Gilale** 1 | (hk.cih.devern.cugirn) Bajêrkeke li başûrê Kurdistanê. Kurdistana îraqê. |
| **Gilale** 2 | (n.x.mê) *nojdarî* Bahîvokên di gerîya mirovî da . Hestîk. |
| **Gilav** | (hn.dar.çewa) Ava gemar. Ava bi teqin. Teqnav. Kurebeq. |
| **Gilavêj** | (n.x.mê) 1.Stêreka geşe li sipêdeyan der di kevit. 2. Navê kiçane. |
| **Gilç** | (n.x.nêr) 1. Dareke ser tîjkirîye dako di erdî da biçit û bi çiklit. Sing.2.Kesek ji piyanve rawestay û pir bi minit. : Dê rûne, tu liser pêyên xwe bûye gilç. |
| **Gilçanê** | (n.dar.mê)Yarîyek (lîstikek) zarokane gilçên xwe di ber êk da di çikilînîn , herkesê ê yê dî êxist dê ji xwe re gilçê berdijê wergire. : Zaro yêd çûyne gilçanê. |
| **Gilçanêkirin** | (k.jn.gl.mê) Liztin bi gilçan. :Em dê gilçanê bikin. :Werin gelî zarokan da gilçanê bi kin. (K) bn : Kirin. |
| **Gildik** | (n.x.mê) Codelîk. Merş.Tatî. |
| **Gildî** | (n.x.mê) Peroyên mîna balolkan hatî werpêçan. Balolik. |
| **Gildîkirin** | (k.jn.l.mê) Werpêçan. Balolkirin. :Min nivînêt xwe gildî kirin û çûm bi xwere birin ser banî.(K) bn:Kirin. |
| **Gilêj** | (n.x.nêr) Gilîz. |
| **Gilêjkirin** | (k.jn.l.mê) Gilîzkirin. |
| **Gilêle** | (n.x.nêr) Babelîsk. |
| **Gilêne** | (n.x.mê) ***candar*** Bîbîka çavî. |
| **Gilik** | (n.x.mê) *zindewerzanî* Tîtilk. |
| **Gilêş** | (n.x.nêr) Bermayîyê xwarin û tiştên malan , sercadan yên di havêjin. |
| **Gilî** | (n.x.mê) Gazinde. Gazin. |
| **Gilîdar** | (n.dar.dn) Gilîkar. |
| **Gilîkar** | (hk.dar.dz, çewa) Kesê gilîyan di ke.Gazindeker. |
| **Gilîkirin** | (k.jn.l.mê) 1.Liser axivtin. Baskirin.2. Gazindekirin. Gelek gilîyan neke!.(K) bn : Kirin. |
| **Gilîz** | (n.x.nêr) Aveke ji devê mirovî, nexasim zarokan di keve. |

| | |
|---|---|
| **Gilîzank** | (n.dar.pirî) Qidqidank. |
| **Gilîankvebûn** | (k.jn.gl.mê) Mirovê ji gilînkan di tirse. Qidqidankên mirovî ve di bin. :Gilîzankêd min ve di bin, destê xwe ne ke zikê min !. |
| **Gilîzkirin** | (k.jn.l.mê) Dema gilîz ji devê mirovî, xasim zarokan di keve. (K) bn : kirin. |
| **Gilîzok** | (hn.dar.çewa) Mirovê dev bi gilîz. Devgilîz. |
| **Gilken** | (hk.cih.l.mê) Cihê(çala) axê jê ra di ken jibo avahîyan û karên din.Çal. |
| **Gilok** | (n.x.mê) Têkalandina bendikan tanî şêweyekê girover jê peyda di be.Gilolk. Gilolka bendikan. |
| **Gilol** | (n.x.mê) Xwarineka kurdî ye, ji dewî yan mastî û danî[birnc, savar] çê di kin. |
| **Gilolk** | (n.x.mê) Gilok. |
| **Gilolkkirin** | (k.jn.l.mê) Badana bendikan tan awayê girover werdigire.Çêkirina gilolkan. (K) bn:Kirin. |
| **Gilor** | (hn.x.çewa) *endaze* Fêweyên girovir. Xir. |
| **Gilorbûn** | (k.jn.l.mê) Girêlbûn.:Bagurdan di banî keft û li kolanê gilor bû.(K) bn:Bûn. |
| **Gilorkirin** | (k.jn.l.mê) Girêlkirin. :Xwe di kenda da gilor kir. (K) bn: Kirin. |
| **Giloxe** | (hn.x.çewa) Çûçelkên qaz û werdekan. |
| **Gilpe** | (n.x.mê) Gurîya agir. Agir. |
| **Gilviçandin** | (k.jn.dar.mê) Perçiqandin. Herişandin. Givaştin. (K) bdn: Ez di gilviçînim. em di gilviçînîn, tu di gilviçînî hûn di gilviçînin, ew di gilviçîne[...it] ewan di gilviçînin. Pr: dê bi+bdn. Bdb : di Gilviçand, di gilviçandin, Db,dûr : gilviçandibû,...bûn. bi gilviçîne, bi gilviçînin. |
| **Gimandin** | (k.jn.x.mê) Dengek hêdî[kiz] jê anîn, jê berdan. (K) Bdn: ez di gimînim em di gimînîn, tu di gimînî hûn di gimînin, ew di gimîne[..it] ewan di gimînin, Pr: dê bi +bdn. Bdb: di gimand, di gimandin, Db,dûr:Gimandibû,... bûn. (F): bi gimîne, bi gimînin. |
| **Gimgimok** | (n.dar.dz) ***candar*** Kimkime. :Gimgimokê li ser kevirî rawestaye. |
| **Gimîn** | (k.jn.x.mê) Dengek kiz jê hatin mîna tivêna pêşî û mêşan. Di gimîne, di bi gimînin, bi gime. |
| **Ginawir** | (n.dar.dz) Giyandar. Jîyandar.Candar.: Ewê he çi ginawire,li wê derê rawestaye ?. |
| **Gincir** | (n.x.nêr) Kincir |
| **Gincirandin** | (k.jn.dar.mê) Dirandin. Çirçirkirin. .(K) bdn: ez di gincirînim em di gincirînîn, tu di gincirînî hûn di gincirînin, ew di gincirîne[...it] ewan di gincirînin. Pr : dê bi+bdn. Bdb : di gincirand,di gincirandin.Db,dûr: gincirandibû,...bûn. (F) :Bi gincirîne, bi gincirînin. |
| **Gindirandin** | (k.jn.x.mê) Girêlkirin. Pêçan. Werbadan. Girovirkirin. (K):Bdn: ez di gindirînim em di gindirînîn, tu di gindirînî hûn di gindirînin, ew di gindirîne[...it] ewan di gindirînin.Pr: dê bi+bdn. Bdb: Di gindirand, di gindirandin. Db,dûr:Gindirandibû,... bûn. (K) :Bi gindirîne, bi gindirînin. |
| **Gindirîn** | (k.jn.x.mê) Girêlbûn. Girovirkirin. :Berek ji kendalî gindirî û ket navagundî. |
| **Gindor** | (hn.x.çewa.n.x) *şêwe* 1.Girovir. Xir.2. *fêqî* Gundor. |
| **Ginegin** | (n.dar.mê) Dengê yan axivtina di difinê ra. |

| | |
|---|---|
| **Ginginî** | (hk.dar.çewa) Mirovê di difinan ra di axivit. |
| **Gir** 1 | (n.x.nêr) 1. Agir. 2. ***derd*** Nesaxîyeke leşê mirovî di sojit. |
| **Gir** 2 | (hn.x.çewa) Mirovek yan tiştekê bi kelex, mezin. Qebe. :Ev zebeşe çend yê gire!. Brx Hûr. |
| **Gir** 3 | (n.x.nêr) Bilindayî, girik. Çiyayê biçûk. :Ez çûm serê girî. :Mala wan li serê girî ye. |
| **Giram** | (n.navnet.mê) Yekeyeka pîvanê. Êk ji hizar a kîloyê. |
| **Giran** | (hn.x.çewa) 1. Tiştê bihayê wî pitir pare be. Mitayê nirxa wî ji asayî pêtir bit. Brx Erzan. :Nirxeya van perokan gelek ya girane, kes nikare bi kire. 2. Tiştê bi seng .Bi bariste. BrxSivik. 3. Mirovê xwedî rûmet. Mezin.Hêja. : *pend* Giran be da giravî bî. |
| **Giranbiha** | (hn.l.çewa) Hêja. Rêzdar. Rûmetdar. |
| **Giranbûn** | (k.jn.l.mê) 1. Dema nirxeya kelûpelan di çit serî. . :Fewtek li bazarî pir giran bûye. :Bihayê xwarinê rij bo rojê girantir di be. 2. Dema baristeya tenan pêtir di be. :Senga garîtey gelek ya giran bûy,jiber ko li ber baranê bû. (K) bn: Bûn. |
| **Girandin** | (k.jn.x.mê) Dema mirov yekî bi gotinan wesa lê bike ko dest bi girîyê bi ke[bi girît]. ***Pend*** :Yê te bi girîne dostê teye, ne yê te bi kenîne.(K) Bdn: ez di girînim em di girînîn,tu di girînî hûn di girînin, ew di girîne [..it]ewan di girînin. Pr:dê bi+bdn. Bdb :Di girand, di girandin. Db,dûr : (min êkgirandibû), ..wî ez girandibûm..,.bûn. |
| **Giranî** | (n.dar.mê,hn.çewa) 1. Baristeya giran. Senga mezin. : Giranî ya vî kevirî çende?.Giranîya tirombêla te çende?. Brx Sivik. 2. Bilindbûna bihayê kelûpel û xwarinê. Qetlazî.: Li welatên rojava pir giranîye. Brx erzanî. |
| **Girankirin** | (k.jn.l.mê) 1. Bilindkirina bihayê tiştî. :Te zanî ye bihayê fêqî yê hatî giran kirin?. BrxErzankirin. 2.Bariste pitir lê kirin. : Te barê kerê xwe giran kirîye. Br×Sivikkirin. |
| **Girar** | (n.x.mê) Xwarina wek savar , birinc,danqut, htd. : *pend* Girara ron ji kêm danîye. ***Pend*** :Xwê ya xwe di ke nav hemî giraran. ang;mirovê davdoz û matêker. ***Pend*** :Girara mêran bi bêhna fireh di kele. ***Pend*** :Girara ron ji kêm danî ye. |
| **Girav** | (hk.cih,n.l.mê) *erd* Parçe erdekê axe, hemû rex û çanên wî ave. Girê di avê da. |
| **Giravî** | (malbn) 1. Hozeka koçeran a kurdane.2. Kesê giravî. Kesê bi rûmet. Hêja. : *pend* Giran be da yê giravî bî. |
| **Giraw** | (n.x.mê) Gerew. |
| **Girbûn** | (k.jn.l.mê) Hişînbûn. Geşbûn.Mezinbûn. Qebebûn.:Kerikên hinaran yêd gir bûyn. (K) bn: Bûn. |
| **Girdane** | (n.dar.mê) Corekê stovankane ji zêr yan zîvî ye. Berben. |
| **Girde** | (n.x.mê,hn.çewa) 1. *erd* Girav.2. *giyan* Kemax.3. Pareyên gir. |
| **Girdek** | (n.dar.mê) *rêzman* Pîtên mezin. Pîtên gir. |
| **Girdik** | (n.dar.mê) *giyan* Masolke. |
| **Giregir** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengê ewran, tirombêlan,amêran û htd. Girên. |

| | |
|---|---|
| **Girev** | (n.x.mê) Dema mirov dijî kiryarekê radiweste. Gireva birçîbûnê.xwe zahidkirin. Ne xwarina zadî. |
| **Girevgirtin** | (k.jn.l.mê) Mirov girevê di gire.Mangirtin. Kurdistanîyan heyama çend rojan gireva birçîbûnê girtin dijî desdirêjîyên dagîrkeran. (K) bn :Girtin. |
| **Girevkirin** | (k.jn.l.mê) Girevgirtin. (K) bn :Kirin. |
| **Girê** | (n.x.mê) 1. *nojdarî* Cihê êvitî li ser leşî. : Girêyek ya liser milêmin çêbûy. Kulik.2. Cihê hatî girêdan. Bendikê liser êk ra birî . 3. Asteng. Pirs. 4. Kurîşk : Enîya girê. Navçavên girê.: *pend*Girêya bi destan ve di be, pêdivî didanan nake. |
| **Girêba** | (n.l.mê) *derd* Nexweşîyeke, masolke û gehên mirovî jan dike.. Ba. |
| **Girêbend** | (n.l.mê) 1.Cihê girê ya bendikî lê hatî tundkirin . 2. Peyman.Raport. Rêkkeftin. Girêbenda jinînanê. Marekirin. Markirina jin û mêran. |
| **Girêcan** | (n.l.mê) Bêhinkurtik. Bêhinçikbûn. |
| **Girêçik** | (n.dar.mê) *candar* Gehên tibilan. Gehên tilîyan. |
| **Girêdan** | (k.jn.l.mê) Pêkvenûsandin. Tiştê girêdayî. Pêkve tundkirin. : Doxîna xwe girê da. Dewar girêdan. (K) Bdn:Ez girêdidim em girêdidin, tu girêdidî hûn girêdidin, ew girêdide  [..it] ewan girêdidin.(bi girêdan). Pr:dê bi +bdn. Bdb : girê dida,(di girê da) girê di dan(di girêdan). Db,dûr : girêdabû,..bûn. (F): bi; girêde bi girêdin(girê bide, girê biden). |
| **Girêdank** | (n.dar.mê) Peyman. Girêbend. |
| **Girêdayî** | (hk.dar.çewa) Hatî girêdan. Ne serbixwe. : Ew yê girêdayîye bi karên malê ve. |
| **Girêj** | (n.x.mê) ***candar*** Memik. Guhan. |
| **Girêjkirin** | (k.jn.l.mê) Dema nêzbûna zanê(serzan), guhanên kewalan gir di bin. : Bizinê girêja xwe ya kirî, dê li van rojan (bi) zêt. |
| **Girêk** | (n.dar.mê) Girêyek biçûk. Girêya biçûk. |
| **Girêkor** | (n.l.mê)Girêya bi darî tund kirî. Îşk. |
| **Girêlbûn** | (k.jn.dar.mê) Dema tiştek di keve û liser alekê xwe ji girek, yan bilindîyekê di zivire û di çe binî. : Kevirek ji çiyay verest û girêl bû tanî bilê gelî. (K) bn: Bûn. |
| **Girêlkirin** | (k.jn.l.mê) Havêtina tenekî ko liser alîyên xwe bi zivirîn di çe. :Tepik li jordanî girêl kir. |
| **Girêmitik** | (n.dar.mê) *erd* Jordanî. Nişîvî. |
| **Girêpêç** | (n.l.mê) Babelîsk. Gerdelûle. |
| **Girgire** | (hn.dar.çewa) Kenkene.Gir. Mezin.:Evro girgirên gundî hemî dê li mizgeftê bi civin. |
| **Girgirk** | (n.dar.mê) Erebanka zarokan. Pêçolk. |
| **Girgîn** | (hn.dar.çewa) Bêhinteng. Bêhinçik. Tengav.:Ez jiber te pir girgînim, çima tu ne xuyayî ?. |
| **Girhar** | (hk.l.çewa) Mirovê har. Mirovê tore. :Jineka girhar. :Mêrekê girhar. |
| **Girik** 1 | (n.dar.nêr) 1.*erd* Girê piçûk. 2. Tepikêd hevîrî, yêd hatîn vestirîn û berhevkirin jibo pêjtinê. Girikêd hevîrî. :Jinik ya girikan di ket dê nanî pêjit. |
| **Girik** 2 | (n.x.mê) Serma. Seqem. |

| | |
|---|---|
| **Girikhatin** | (k.jn.l.mê) Dema mirovê ji ber sermayê di lerze. :Girikên di hêne vî zarokî ji serman da. (K) bn :Haten. |
| **Giring** | (rd.x.çewa) Tiştê yan karê pêdvî. Fer.Bi biha. :Xwandin jibo me pir ya giringe. |
| **Giringî** | (n.dar.mê) Pêdvî. Pêwîstî. Berkevtî. |
| **Giringîpêdan** | (k.jn.gl.mê) Dema mirov pûteyî bi karek, yan kesekî bi de. Pûtepêdan. :Hikmeta me gelek giringîyê bi malbatên şehîdan di de. (K) bn: Dan. |
| **Giriyan** | (k.jn.x.mê) Giryan. Girîn. |
| **Giriyandin** | (k.jn.x.mê) bn :Girandin. |
| **Girî** | (n.x.mê) Zêmareke bi deng yan bêdeng, ji mirovî der di kevit û hêstir(rondik) ji çavan di barin dema kovanek yan keyfek mezin rû di de. Xirîk. Fîn. :Dengê girî ya zarokekî di hêt guhênmin.: *pend* Girî ya jinê çekê jinê. ***Pend*** :Girîya bûkê ne ya ji dile. |
| **Girîdeng** | (n.l.mê) ***deng*** Lorîn. Dengê girîyê. Zêmar. |
| **Girîkirin** | (k.jn.l.mê) Kiringirî; bn :Girîn. |
| **Girîn** | (k.jn.x.mê) Wekî mirov dengê girîyê ji xwe di hînit. :Eve te çiye, çima tu di girî ?. BrxKenîn. (K) bdn : ez di girîm em digirîn, tu di girî hûn di girîn, ew di girît ewan di girîn. Pr dê [bi]+ bdn. Bdb : di girîm, di girî, di girîn, girîn. Db,dûr : girîbûm,…bûyn,…bûy, …bû,… bûn. (F) : bi girî bi girîn. |
| **Girînok** | (rd.dar.çewa) Mirovê zû zû di girî. Kizgiryok. Dilnazik. |
| **Girkan** | (n.x.mê) Agirdiz. Volkan. |
| **Girkirin** 1 | (k.jn.l.mê) Mezinkirin. |
| **Girkirin** 2 | (k.jn.l.mê) Agir hilkirin. BRx Hûrkirin.(K) bn; Kirin. |
| **Girmandin** | (k.jn.x.mê) Dengê girmegirmê kirin.Di girmîne, girmînin. Bi girmînin. |
| **Girmegirm** | (n.dar.mê) Dengê girmegirmê.:Dengê girmegirma topan. |
| **Girmegirmkirin** | (k.jn.gl.mê) Dengê girmegirmê kirin.: Ew kîye girmegirmê li ser banî di ket?. |
| **Girmik** | (n.dar.mê) Mist. Lep. |
| **Girmixandin** | (k.jn.dar.mê) bn :Germixandin. |
| **Girmixî** | (hn.dar.çewa) Tiştê ji sedema gerim ê pûç bûyî. Genî. Rizî. |
| **Girmixîn** | (k.jn.l.mê) Li ber gemê pûçbûn. Rizîn. :Ev zade yê li ber tavê girmixî!. |
| **Girmişk** | (n.dar.pir) *derd* Germişk. |
| **Girmîn** | (n.dar.mê) Dengê girmegirmê. : Girmîna ewran. |
| **Girnas** | (hn.dar.çewa) Gernas. |
| **Girnijandin** | (k.jn.dar.mê) Mirov bi gotin yan kiryarekê wesa li kesekî bi ke ko bi kene(bi girnije). (K) bdn:ez di girnijînim emgirnijînîn, tu di girnijînî hûn di girnihînin, ew di girnijîne[…it] ewan di girnijînin. Pr: dê bi +bdn. Bdb : di girnijand, di girnijandin. Db,dû : girnijandibû,… bûn. (F) : bi girnijîne, bi girnijînin. |
| **Girnjîn** | (k.jn.x.mê) Dema li serûçavên(sîmayê) mirovî nîşana keyf û kenê dîyar di bit. Kenîyan bê deng. (K) bdn: ez di girnijim em di girnijîn, tu girnijî hûn di girnijin, ew di girnije[..it] ewan di girnijin. PR; dê[bi]+ bdn. Bdb : di |

| | |
|---|---|
| | girnijîm,girnijî, girnijîn. Db,dûr : girnijîbûm,…bûyn,..bûy,..bû,… bûn. (F) : bi girnije, bi girnijin. |
| **Giroşk** | (n.x.mê) Dervank. Tepedor. |
| **Girove** | (n.x.mê) Belge. :Giroveya xandinê. Giroveyên kirîn û firotinê. |
| **Girover** | (hn.x.çewa) bn :Girovir. |
| **Giroverbûn** | (k.jn.l.mê) Bn :Girovirbûn. |
| **Giroverkirin** | (k.jn.l.mê) bn :Girovirkirin. |
| **Girovir** | (hn.x.çewa) *endaze* şêweyê mîna pîta ,O, yan tepikan. Xir. Bazin. :Tepa erdî girovire. |
| **Girovirbûn** | (k.jn.l.mê) şêweyê tiştan, tenan di hêt gihorîn ta xir bibe. Xirbûn. :Gilomiçka befrê di destan da girovir bû. (K) bn: Bûn. |
| **Girovirî** | (n.dar.mê) şêweyê xir. Girovir. |
| **Girovirkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov yan hêzek şêweyê tenan bi gihore tanî girovir di be. :Girikên hevîrî girovir bike!. (K) bn: Kirin. |
| **Girs** | (hn.x.çewa) Mezin.Gir. |
| **Girsandin** | (k.jn.x.mê) Mezinkirin. :Girikên xwe bi girsîne!. (K) bdn: ez di girsînim em di girsînîn, tu di girsînî hûn di girsînin, ew di girsîne[…it] ewan di girsînin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : di girsand, di girsandin. Db,dûr: girsandibû, girsandibûn. (F): Bi girsîne, bi girsînin. |
| **Girsik** | (n.x.mê) *çandin* Corekê hirmîkane, li çûl û beyaran hişîn dibe.Hirmîka kûvî. Hirmîka dêm ya kûvî. |
| **Girsî** | (n.dar.mê) Mezinî. Girî. |
| **Girtek** | (n.dar.mê) Parçe kaxezeke dema mirov tiştekî bi kirit wek girove di din mirovî ko biha, nav û corê wî liser hatîye nivîsîn, caran navnîşana mirovî jî liser tomar di kin. : Ez dê pêlava xwe vegerînim, çunkî jibo pêyên min ya tenge û min girteka wan heye. |
| **Girtik** | (n.dar.mê) *leş* Kirkirk. |
| **Girtin** | (k.jn.x.mê) 1.Ketinedest. Zîndankirin. :Polîsan gunehbar girtin. 2. Daxistin.:Wî xanîyek bi kirê girt. :Rê hat girtin.:Nêçîrvanî kewek girt. :Derî bi gire.(K) Bdn: ez digirim em digirîn, tu digirî hûn digirin, ew digire[..it] ewan digirin PR: dê [bi] + bdn. Bdb: di girt di girtin. Db,dûr: Girtibû,... bûn. (F) : bi gire, bi girin. |
| **Girtî** | (n.dar.dz,hn.çewa) 1. Zindanî. Bend. : Girtîyê, (girtiya) cengê. 2.Girêdayî. : Derê xanî girtîye. |
| **Girtîgeh** | (hk.cih..dar.mê) Cihê girtîyan tê dixin. Zîndan. Girtîxane. |
| **Girtîxane** | (hk.cih..l.mê) Girtîgeh. |
| **Girû** | (hk.cih.x.çewa) Erdê ne çêkirî. Beyar. |
| **Girûn** | (k.jn.x.mê) Kevilkirin. Kevil di ser da anîn xwar. Guran. (K) bdn:Ez di girûm em di girûn[girûyn], tu di girûy hûn di girûn, ew di girût ewan di girûn. Pr:dê bi+ bdn. Bdb : di gura, di guran.db,dûr : gurabû, gurabûn.(F) :Bi girû bi girûn. |
| **Girûxane** | (hk.cih..dar.mê) Cihê serjêkirin û kevilkirina kewal û çevrîyan. |
| **Giryan** | (n.x.mê) Girî. |

| | |
|---|---|
| **Giryandin** | (k.jn.dar.mê) Girandin. |
| **Giş** | (hn.pir) Hemû. Gişt. |
| **Gişkî** | (hn.pir) GişGişt. Hêmû. Tebayî. Gelemperî. |
| **Gişt** 1 | (hn.pir) 1. Teba. Gelemperî. Hemû. |
| **Gişt** 2 | (hn.çewa) Peyt. Ciwan. Zîx. Qişt. |
| **Giştî** | (hn.çewa) Gelemperî. Tebayî. Bi hevre. : Civî me ya giştî ye. BRx taybetî. |
| **Givande** | (hk.cih..x.mê) 1. Cihê bilind. :Wî xwe ji serê givandê havêt xwarê.Kendal. Mil.2. Hêl.Xîç. |
| **Givandin** | (k.jn.x.mê) Hêvên lê kirin. Meyandin. Mast givand. Penîrî bi givîne. Hevîrê givandî jibo sawikan. Hêvênkirin. Tirşkirin. Mehandin.(K) bdn: ez di givînim em di givînîn, tu di givînî hûn di givînin, ew di givîne[..it] ewan di givînin. Pr:dê bi+ bdn. Bdb : Di givnd, di givandin. Db,dûr: givandibû, givandibûn. (F): bi givîne, bi givînin. |
| **Givaştin** | (k.jn.x.mê) Pestan êxistin ser. Perçiqandin. Pestkirin. : Wî destê hevalê xwe girt û givaşt.(K) bdn: Ez di givêşim em di givêşîn, tu di givêşî hûn di givêşin, ew di givêşe[..it] ewan di givêşin. Pr:dê bi+ bdn. Bdb: Di givaşt, di givaştin. Db,dûr: givaştibû,…bûn. (F) : bi givêşe bi givêşin. |
| **Givegiv** | (n.dar.mê) ***deng*** Givên.:Givegiva bayî di hêt. |
| **Givên** | (n.x.mê) ***deng*** Dengê bayî. Dengê hurî.:Givêna bayî. |
| **Givgiv** | (n.dar.mê) ***deng*** Givegiv. |
| **Givişk** | (n.dar.mê) Bizaveke mirov ji egera xewê, westanê, cane xwe ji hev di rakêşit. |
| **Givişkdan** | (k.jn.l.mê) Dema mirov givişkan di de xwe. :Tu çima givişkan di dî xwe, diyare xewa te di hêt ?. |
| **Givir** | (n.x.nêr) *candar* Kitka kûvî. Gîvir. |
| **Givrik** | (hn.x.çewa) Mirovê hêzdar. Mirovê Peyt. Mirovê xurt. |
| **Giya** | (n.x.nêr) Keskatîyê êksalî û biçûk, mîna firîz. Hişînkatî. : *pend* Giya liser binê xwe hişîn di be û liser binê xwe jî di behe.***Pend***:Giya ewe yê bi devê bizinê xoş bit. |
| **Giyabenîşt** | (n.l.nêr) ***giya*** Giyayeke mîna benîştî bi kar di hêt. Qaçik. |
| **Giyagewrk** | (n.l.nêr) ***giya*** Core giyayek rengê wî keskek ber bi gewrî ve ye, xwarina kewalane bi terî yan hişkî. |
| **Giyagezok** | (n.l.nêr) ***giya*** Gezînk. |
| **Giyagêzik** | (n.l.nêr) ***giya*** Giyayeke jibo gêzikan bi kar di hînin. |
| **Giyan** | (n.x.nêr) 1.Can. 2. Jiyan. Leş ***Pend*** : Ne zanî xweşîya giyanî. |
| **Giyandan** | (k.jn.l.mê) Xwe gorîkirin. Mirin. (K) bn: Dan. |
| **Giyandar** | (n.dar.dz) Candar. Jiyandar.Mirov giyandare, hesp, kitik, kew,masî û htd, giyandarin. |
| **Giyangirtin** | (k.jn.l.mê) Qelewbûn. :Wî piçek giyan girtîye. |
| **Giyanî** | (n.dar.mê) Ti/tê girêdayê bi giyan ve. Canî. |
| **Giyanleber** | (n.dar.dz) Giyandar. |
| **Giyaxor** | (hk.l.çewa) Giyandar yan mirovên tinê xwarina giyayî di xon. BRx Goştxor. |
| **Giyaxwer** | (hk.l.çewa) Giyaxor. |

| | |
|---|---|
| **Giz** | (n.x.mê) Hizir. Viyan. Hez. Balkişandin. |
| **Gizdar** | (hn.dar.çewa) Balkêş |
| **Gizêr** | (n.x.mê) *giya* Gêzer. |
| **Gizgiz** | (n.dar.mê) Lerzîn. Lerzik. |
| **Gizgizandin** | (k.jn.dar.mê) Lerzandin. Hejandin. Vehejandin. Livandin. Zirziqandin. (K) bdn: ez di gizgizînim em di gizgizînîn, tu di gizgizînî hûn di gizgizînin, ew di gizgizîne[..it] ewan di gizgizînin. Pr: dê bi + bdn. Bdb: di gizgizand, di gizgizandin. Db,dûr: gizgizandibû, gizgizandibûn. (F): bi gizgizîne, bi gizgizînin. |
| **Gizgizîn** | (k.jn.x.mê) Lerzîn. Livîn. Gijyan. (K) bdn: ez di gizgizim em di gizgizîn, tu di gizgizî hûn di gizgizin, ew di gizgize[...it] ewan di gizgizin. Pr: dê bi +ben. Bdb: ez di gizgizîm, em di gizgizîn, tu di gizgizî, hûn di gizgzîn, ew di gizgizî, ewan di gizgizîn. Db,dûr: ez gizgizîbûm, em gizgizîbûyn(bûn), tu gizgizîbûy, hûn gizgizîbûn, ew gizgizîbû,(gizgizî,..bibû,bûn,bûm,bûy, bûyn) |
| **Gizgizkirin** | (k.jn.l.mê) Dengê gize gizê jê derkevtin. Lerzîn. |
| **Gizing** | (n.x.mê) Elind. |
| **Gizîr** | (kar,n.dz) Mezinê gund û êl . Serwer. Semyan. Kwîxe.***Pend***:Gund bê gizîr na be.ang; tu cih di bê xwedî nînin. |
| **Gizvanok** | (n.dar.mê) Kezî.Gulwaz. |
| **Gî** | (n.x.nêr) 1. Gişt. Hemû.2.Bermayî yê xwarinê yê ko ji paşîya giyandaran der di kevit. Zibil.pîsatî.Rîx. Desnivêj. Gû. |
| **Gîhanek** | (n.dar.mê) *rêzman* Pêrbest. |
| **Gîfank** | (hk.cih..x.nê) Cihê ziblî lê xir ve di ken. Gîfik. Sergîfk. Zibildan. |
| **Gîfik** | (n.x.mê) 1.Serkên pateyî bi rîşîk, nexşandî di êxin kulav, dersok û perokan jibo ciwanî yê. ***Pend*** :Te gîfik birnê! Ang; dema mirov karekî, çi jê çê neke. 2. Gîfank. Sergîfk. |
| **Gîl** | (n.x.mê) Herî. Teqin. Kur(khur). |
| **Gînî** | (n.x.nê) Cewal.Cihal. Ferde.Gûnî. |
| **Gîr** | (hn.x.çewa) Tund. Asê. Girtî. Rawestayî. |
| **Gîrav** | (hk.cih..l.mê) Ava têkel di gel madek din wek av û xuwê. |
| **Gîrbûn** | (k.jn.l.mê) Qebizbûn.Rawestan. Asêbûn. (K) bn:Bûn. |
| **Gîrhe** | (n.x.mê) Madeyekê sipî yê tarîye[şîrî], li binê çaydank, cerik, qazan û htd, ve çê di bit ji wan madeyên digel avê û bayî. |
| **Gîro** | (hn.x.çewa) Vemayî. Ne gehiştin. Paşve, paşda man. |
| **Gîrobûn** | (k.jn.l.mê) Dema tiştek , mirovek zû ne gehit jivan yan ser karê xwe.(k) bn: Bûn. |
| **Gîrokirin** | (k.jn.l.mê) Paşda hêlan. :Te ez gîro kirin, êdî na gehim ser karî. ***Pend*** :Zivistanan xwe gîro neke, biharan xwe ter neke.(K) bn: Kirin. |
| **Gîsin** | (n.x.nêr) Gêsin. |
| **Gîsinkirin** | (k.jn.l.mê) Gêsinkirin. |
| **Gîsk** | (n.x.dz) *candar* Karê êk salî piştî ji şîrxwarinê ve di bit. :Gîskê melayî. |
| **Gîştin** | (k.jn.x.mê) bn Gehiştin. |
| **Gîtar** | (n,biyan.mê) ***mûzîk*** Amêrekê jenînê yê mûzîkê ye. |

| | |
|---|---|
| **Gîx** | (n.x.mê) Xîçeka kêşayî ya bazinî. Xîç. |
| **Gîya** | (n.x.nêr) Giya. |
| **Gîyandar** | (ndar.dz) Giyandar. |
| **Gîz** | (n.x.mê) 1. Darek mezin û xemildare. 2. Berê bi dargîzê ve dihêt, xire, reqe û kakilka wê wek xwarin bi kar di hînin.***Pend***:Gîzên xwe li ser dilê xelkî di şikêne.ang; mirovê hemû gazin û arêşeyên xwe bibe cem êkê tilove ji arêşeyan. ***Pend*** :Gîz liser difinê şikandşikênand). ***Pend*** :Gîza mizgeftê ye.ang ; kesê yan tiştê nazdar û bijîn. |
| **Gîzan** | (n.x.mê) 1. Mûsa rih tiraşînê.2.Kêrik. Sator. |
| **Gîzankirin** | (k.jn.l.mê) Tiraşîn. Rihêd xwe gîzan kirin. :Serê wî gîzan kir. (K) bn : Kirin. |
| **Gîzankirî** | (hk.l.çewa) Ser yan rihêd hatîn tiraşîn.Rût. Rûtkirî. |
| **Gîzik** | (n.x.nêr) ***candar*** Kulî. |
| **Go** | (n.x.mê) 1.Milhêb. Çarguh. Duguh. 2. Tepe.Gog.Gok. |
| **Goçan** | (n.x.nêr) Gopal. |
| **Gog** | (n.x.mê) Go. Gok.Tepik. |
| **Gogirandin** | (k.jn.dar.mê) Tiştê ko mirov bixwaze guhorîna têda bi kit , hindek jê kêm kit çi bi birîn , tiraşîn yan kurtkirin. Beran jibo avakirinê di gogirînin. . (K) bdn: ez di gogirînim em di gogirînîn, tu di gogirînî hûn digogirînin, ew digogirîne[..it] ewan di gogirînin. Pr: dê bi +bdn. Bdb : di gogirand, di gogirandin. Db,dûr : gogiradibû, gogiradibûn. (F): bi gogirîne bi gogirînin. |
| **Gok** | (n.x.mê) Tepe. Tepik. Goka pêy. Goka destî. |
| **Gokanê** | (n.dar.mê) Kirina yarîya tepanê. Lîstin bi gokê. |
| **Gol** | (n.x.mê) 1.Di lîstina tepa pêyda, ciheke di navbera du daran da û tor kirîye, tepê di havînê. 2. Cihê pengandin û xirvekirina avê.Gom. Derya. |
| **Golanê** | (n.dar.mê) Yarîya (lîstika) Tepa pêy. Fotbol. |
| **Golçî** | (karn.dar.dz) Kesê li ber golê ye jibo ne hêle tepe bi keve gola wan. |
| **Golik** | (n.x.dz,, hn.çewa)1. Têjikê çêlê. Conega.2. Mirovê nezan û xişîm. : ***pend*** Golik bi çikeçikê na bite ga. ***Pend*** :Golikê biyanî werîsê xwe di piçîne.Pend :Bi golkanî tirsandî ye. |
| **Golikvan** | (pîşn.dar.dz.) Kesê di çe ber golikan û çavdêrîya wan dike. |
| **Golikvanî** | (karn.dar.dn) Karê liber glikan. Sexbêrîya golikan. |
| **Golkirin** | (k.jn.l.mê) Tomarkirina xalan di lîstika tepa pêy da.:Yaneya Duhok du gol kirin hembera xwer. (K) bn: Kirin. |
| **Gom** | (n.x.mê) Gola avê. |
| **Goman** | (hn.x.çewa) Ne piştrastî. Dudilî. : Bi hatina wî ez bi gomanim. |
| **Gomanbar** | (hn.l.çewa) Mirovê cihê gomanê. Mirovê ne cihêbawerîyê. |
| **Gomankirin** | (k.jn.l.mê) Mirovî goman ji karek yan kesekî he be û bawerî pê ne be. Mirov ji kiryarekê pişrast ne be.(K) bn : Kirin. |
| **Gone** | (n.x.mê) Gep. Rû. |
| **Gopal** | (n.x.nêr) Dareke serê wî çemandî ye di destê xwe di girin û serê dî rast û dirêje, jibo hajotina kewal, rêveçûn û karên din mifa jê di hêt wergirtin. Gopalê şivanî. |
| **Gopik** | (n.x.mê) Ser yan dawîya her tiştî. :Gopika darê .:Gopika çîyay. Kopik. |

| | |
|---|---|
| **Gor** 1 | (hk.cih.x.nêr) Cihê mirîyan têda di veşêrin. Ziyaret. Tirbe. |
| **Gor** 2 | (pêrb) ***rêzman*** Alavê girêdanê ye.Li gor. Li pey. Li dû. : Li gor şiyanên xwe em dê xebatê bi kin. :Li gor zanîna min, ew kurê seydayê gundî ye. |
| **Goran** 1 | (hk.cih.devern,cugir) 1. Deverek Kurdistanê ye. 2. Xelkê goran.3. Navê mêran. |
| **Goran** 2 | (n.x.mê) Cihê pir dehil û giya.Mêrg. Çîmen. |
| **Gorangeh** | (hk.cih..dar.mê) Mêrga cihê seyran û bêhinvedanan. |
| **Goranî** 1 | (n.x.mê) Devokeke ji zimanê kurdî.. |
| **Goranî** 2 | .(n.x) Stiran. Lavje. |
| **Gore** | (n.x.mê) Cilikek taybete ji pembû,naylon yan hirî, çêkirîye mirov di kin pêyên xwe. |
| **Gorevan** 1 | (pîşn.dar.dz) Jin yan mêrê goreyan di çinit. |
| **Gorevan** 2 | (pîşn.dar.dz) Kesê karê wî kolan û çêkirina gorane jibo veşarina mirîyan. Gorvan. |
| **Goristan** | (hk.cih..x.mê) Cihê ji gelek gorên mirîyan pêkhatî. Cihê goran, tirban. Welatê mirîyan. Goristana şehîdan. |
| **Gorî** | (hn.x.çewa) Qurban. Heyran. : ***pend*** Jûjîko day gorîko bê stirîko.ang; dema malê mirovî li ber çavên mirovî pir şirîn be. |
| **Gorîbûn** | (k.jn.l.mê).Ji pêxemet dozekê mirov di be qurban. : Ez gorî welatê xwe bim. (K) bn: Bûn. |
| **Gorîçe** | (n.x.mê) Kêlîya gorî. Kêlîya tirbeyan. |
| **Gorîkirin** | (k.jn.l.mê) Xwe gorî, qurbanî rêyekê kirin. : Wî xwe kir gorî welatî jibo azadî yê. (K) bn: Kirin. |
| **Gorîn** | (k.jn.x.mê) Gihorîn. |
| **Gosale** | (n.dar.dz) Golikaş golikê yek salî. Canega. |
| **Goşe** | (yek.endaze) Kujî. Quncal. Quncik. |
| **Goşegîr** | (hk.dar.çewa) Kesê hez ji jiyana bi tenê di ke. kesê têkelî bi mirovan tune be, yan kêm be. Êkane. |
| **Goşegîrî** | (n.dar.mê) Cudayî. Tekane. |
| **Goşepîv** | (n.dar.mê) ***endaze*** Amêreke jibo pîvan û çêkirina goşeyan liser kaxez û erdî. |
| **Goşt** | (n.x.mê) Nermeya leşê giyandaran . Goştê bizin, pez , mirîşk, htd. Goştê birajtî[liser agir], qelandî[di rûnî da], kelandî[di avê da]: ***pend*** Goştê mêran ne bi kêşan û pîvane; ango nirxandina mirovan ne bi kelwaşê wane.***Pend*** :Goştê leşê xwe di xwe.ang; karê mirov pir ne ji dil û xurtî bi ke. ***Pend*** :Xudê goştî di de bêdidanan.ang; mirovê nezan, tiştê çak di kevit destî,lê bihayê wî nizanit. |
| **Goştfiroş** | (pîşn.l.dz) Kesê goştî di firoşe. |
| **Goştfiroşî** | (hk.cih) Cihê firotina goşî. Qesabxane. |
| **Goştgirtin** | (k.jn.l.mê) Qelewbûn. |
| **Goştnexur** | (hk.l.çewa) Mirov yan candarên goştî na xun,ango tenê xwarinên giyayî di xun. |
| **Goştxor** | (hk.l.çewa) Mirov yan candarên xwarina wan goşte. |

| | |
|---|---|
| **Goştxwer** | (hk.l.çewa) Goştxor. |
| **Gotar** | (n.x.mê) Peyv, gotina hatî pêşkêş kirin. :Te guhdarî li gotara serokî kir?. |
| **Gotardan** | (k.jn.l.mê) Dema kesek gotarekê belav di ke, di xwîne, di de. (K) bn:Dan. |
| **Gotarvan** | (pîşn.dar.dz) Kesê gotarê berhev uan pêşkêş di ke. |
| **gotegot** | (n.dar.mêr) Gotin û bûyerên liser devê xelikî di hên gotin. Gotgotik. |
| **Gotin** | (k.jn.x.mê) 1. Peyvîn. Axivtin. 2. Peyv. Wuşe. Axivtin. : ***pend*** Hizar gotin gorî kiryarekê bi bin. (K): Bdn: ez di bêjim em dibêjîn, tu di bêjî hûn di bêjin, ew di bêje[…it] ewan di bêjin. Bdb: di got, di gotin. Pr: dê bi+ bdn. Db,dûr : gotibû,... bûn.(F): bi bêje, bi bêjin. |
| **Gotûgo** | (n.l.mê) Gengeşe. Miştûmir. Danûsitandin. |
| **Gov** 1 | (hk.cih.x.mê) Cihê , avayî yê kewalan. :Gova pezî. Govabizinî. |
| **Gov** 2 | (hk.cih.x.mê) Deryak. Gol. Gera avê. |
| **Govan** | (hn.dar.dz) Kesê bûyer bi çavên xwe dîtî. Dîdvan. |
| **Govanî** | (karn.dar.mê) Bi çav dîtin. Dîdvanî. |
| **Govanname** | (n.l.mê) Girove û nivîsîna liser bûyeran. |
| **Govend** | (n.x.mê) 1.5ahî . dîlan . Dewat. 2.Navê keçane. : ***pend*** şer govenda mêrane. |
| **Govenddanan** | (k.jn.l.mê) Weke desteyeka mirovan mêr û jin destê hev di girin û govendê di kin. (K) bn : Danan. |
| **Govenddanîn** | (k.jn.l.mê) Govenddanan. (K) bn; Danîn. |
| **Govendgêr** | (hk.dar.çewa) Kesên govendê di ken. |
| **Govendgêran** | (k.jn.l.mê) Govendgirtin. (K) bn: Gêran. |
| **Govendgirtin** | (k.jn.l.mê) Govenddanan. : Xortino, keçino werin govendê bi girin!. (K) bn: Girtin. |
| **Goyîj** | (n.x.mê) ***darûbar*** Gihîşk. |
| **Goyîn** 1 | (hn.x.çewa) 1. Mirovê bi kenî.Pêkenok. Lêbûk. Oyîn.2. Dema borî, dema çûyî. |
| **Goyîn** 2 | (n.x.mê) Kotira daristanan. Gapil. |
| **Goyîn** 3 | (n.x.mê) Zêrevanî. Çavdêrî. |
| **Goyînvan** | (kar,n.n.dar.dz) Zêrevan. Çavdêr. |
| **Goz** | (n.x.nêr) Amaneke ji axek nemaze di hêt çêkirin jibo av têkirinê . Cerikê biçûk. : ***pend*** Gozik bi rêya avê ve dişikê, ango ;dema mêrxasek tê kuştin. ***pend*** Gozikê nî ye, ava tezî ye, ang ; tiştê nû yê şirîne. |
| **Gozek** | (n.x.mê) ***leş*** Cotekê hestîyên reqin, di kevin herdu alên her yek ji pêyên mirovî. |
| **Gozik** | (n.x.nêr) Gozê biçûk. |
| **Guçik** 1 | (n.x.nêr) ***leş*** 1.Guh. |
| **Guçik** 2 | (n.x.mê) ***endaze*** Kujî. Swî. |
| **Guh** | (n.x.nêr) ***leş*** Hedamê bihîstinê, guhlêbûnê (guhdarîkirinê) ye. Guçik. : ***pend*** Guhê xwe bi de min belê, çavê xwe ne ke min. ***pend*** Guh nede mirovê nezan da ne bî peşêman. Pend :Di guhekî ra diçe, di yê din ra derdikeve.ang ; kesê mejîhişk. |

| | |
|---|---|
| **Guhan** | (n.x.mê) ***leş*** Endamê şîrî ê giyandarane. Guhandîn. Çiçik.: Guhanên çêlekê. Guhanên bizinê. |
| **Guhar** | guhark (n.x.nêr) Xelek û pirtên zêr yan zîv yan kanzayên din, jin di kin guhên xwe.Pend :Bi ke guhark û bi ke guhê xwe.ang; şîreta ko na be bi hêt ji bîr kirin. |
| **Guharîn** | (k.jn.x.mê) Guhorîn. Guhartin. |
| **Guhartin** | (k.jn.x.mê) 1. Tişt pêk guhorîn .Xanîyên xwe guhartin. 2. Tiştekî ji cihek bo yê din bê veguhaztin.(K) Bdn: ez di guhorim em di guhorîn , tu di guhorî hûn di guhorin, ew di guhore[..it], ewan di guhorin. Pr: dê bi + Bdn. Bdb : di guhart, di guhartin. Db,dûr: guhartibû,...bûn. (F): bi guhore bi guhorin. |
| **Guhastin** | (k.jn.x.mê) Guhaztin. |
| **Guhaztin** | (k.jn.x.mê) Tiştek ji cîyekî bo êkê dî bi hêt birin.. Veguhastin. (K) Bdn :ez di guhêzim em di guhêzîn, tu di guhêzî hûn di guhêzin, ew di guhêze[…it] ewan di guhêzin. Pr : dê bi +bdn. Bdb : di guhast,(guhazt) di guhastin(guhaztin). Db,dûr : guhaztibû, .... bûn.(F) :bi guhêze, bi guhêzin. :Boka xwe guhztin (veguhastin). |
| **Guhbel** | (rd.l.çewa) Mirovê guhên wî bel bin. |
| **Guhdan** | (k.jn.l.mê) 1.Bihîstin. Guhlêbûn. 2. Bi dilî kirin. Pêgirîkirin.3.Balkişandin. : ***pend*** Guh nede yê nezan, da nebî peşêman.(K) bn :Dan. |
| **Guhdar** | (hk.dar.çewa) 1. Mirovê tiştî wer di gire. Pêgir. 2. Navê mêrane. Ew gelek guhdare. |
| **Guhdarî** | (n.dar.mê) 1. Pêgirî. 2. Guhdan. Bîstin. |
| **Guhdarîkirin** | (k.jn.gl.mê) Mirov guhê xwe bi de deng, mûzîk, stran û htd. :Te îro guhdarîya nûçeyan kir?. (K) bn: Kirin. |
| **Guhderz** | (hn.dar.çewa) 1.Bîrtîj. 2.Guhdar. Sernerim. |
| **Guhdêr** | (hn.dar.çewa) Guhdar. Sernerim. |
| **Guherîn** | (k.jn.x.mê) guhorîn. |
| **Guhêrandin** | (k.jn.x.mê) Guhorîn. |
| **Guhêrbar** | (hn.dar.çewa) Mirov, candar yan tiştê bi kêrî guhorînê were. Bi sanayî di hêt guhorîn. |
| **Guhêrek** | (hn.dar.çewa) Guhêrbar. |
| **Guhêrgeh** | (hk.cih..dar.mê) Cihê guhorîna pareyî. |
| **Guhêrîn** | (k.jn.x.mê) Guhorîn. |
| **Guhêrk** | (n.x.mê) Guhorîn. ***rêzman*** Paşgir. Pare, cil, fêqî-guhêrk. |
| **Guhgiran** | (hn.l.çewa) Mirovê na bihîze yan baş na bihîze. Kher. |
| **Guhiş** | (n.x.mê) Panîya bêlavê. Çimik. |
| **Guhişandin** | (k.jn.dar.mê) Hicmetîkirin. : Ew te çi got, te hosa xelik hemû te guhişandin.(K) bdn : ez di guhişînim em di guhişînî, tu di guhişînî hûn di guhişînin, ew di guhişîne[…it] ewan di guhişînin.Pr : dê bi +bdn . Bdb : di guhişand, di guhişandin. Db,dûr : guhişandibû, uhişandibûn.(F) bi guhişîne, bi guhişînin. |
| **Guhişîn** | (k.jn.dar.mê) Ji egara tirs yan mizgîneka ne xweş, mirov bêdeng di bit. Mitbûn. Daman. Sarbûn. Hicmetîbûn. (K) bdn : ez di guhişim em di guhişîn, |

| | |
|---|---|
| | tu di guhişî hûn di guhişin, ew diguhişe[…it] ewan di guhişin. Pr : dê bi +bdn. Bdb : ez di guhişîm em hûn, ewan di guhişîn, tu,ew di guhişî. Db,dûr : ez guhişûbûm(bibûm) em guhişîbûyn, tu guhişbûy, ew guhişîbû, ewan guhişîbûn. (F) :Bi guhişe, bi guhişin. |
| **Guhîj** | (n.x.mê) ***dar- fêqî*** Guhîşk. Gihîşk. |
| **Guhîşk** | (n.x.mê) Guhîj. |
| **Guhlêbûn** | (k.jn.l.mê) Bihîstin. :Çîroka te noke gotî min tu caran guh lê ne bûye !. (K) bn : Bûn. |
| **Guhlêkirin** | (k.jn.l.mê) Guhdarîkirin. (K) bn : Kirin. |
| **Guhmasî** | (n.l.dz) Şeytanok. |
| **Guhnelî** | (n.dar.mê) Karê perîn û cotbûna candaran. |
| **Guhnêrî** | (n.dar.mê) Perîna giyandaran. Guhnelî. |
| **Guhşor** | (hn.l.çewa) Mirove herdem serê xwe di tewîne(çemîne) naxwazit guh bi de tu kesan. |
| **Guhveçinîn** | (k.jn.l.mê) Mirov û giyandar li dema pêjinek yan dengek di hêt,guhên xwe bel di ken jibo baş bi bihîzin. (K) bn: Veçinîn. |
| **Gujim** | (n.x.mê) Bireka pareyî dema komkirin, parvekirin,jêbirin û lêkdan ko jiber di mînit. Yekeyeke jibo bireka peran tê gotin. : Perê ko hatî mezaxtin jibo kirîna xwarin, cil û hatin û çûnê di be €100,00.: Pirojeyek bi gujmê bîshizar dînaran hat dest pêkirin. |
| **Gujîn** | (k.jn.x.mê) Hêriş. Hêrişkirin. Bi guje, bi gujin. Di gujim, di gujin, di gujîn , dê bi gujim, di gujî, di gujîn, gujîbû,. |
| **Gul** | (n.x.mê) 1.Kulîkên rengîn û ciwan bi dar û giyayan ve dihên, li hindek daran ber[fêqî] jê çê di be. Gula, zer,sor, sipî û htd.2. Navê keçane.: ***pend*** Gul ji stirîyan di bin û stirî jî ji gulan.***Pend*** : Heger gul nebî,sirî jî ne be.ang; heger her nikarî karên çak bi kî, yên xirab neke!. |
| **Gulac** | (n.dar.mê) Pişkovk. |
| **Gulan** | (hk.dem) Meha dawîyê ji biharê. Meha pêncê.: ***pend*** Meha gulanê, xudêyo ne de tava baranê, pezkûvî yê liber zanê. |
| **Gulav** | (n.l.mê) Ava bêhinxweş a ji gulan di hêt wergirtin, mirov li xwe di kin. |
| **Gulavdan** | (n.l.mê) Aman yan şûşeyêd gulavê tê dixin. |
| **Gulbejin** | (hn.l.çewa) Jin yan mêrê bejinzirav û ciwan. |
| **Gulberoj** | (n.l.mê) Gulek mezine reng zere, qeda wê dirêj raste, belgên kesik û pan di det, rûnî jê dirist di ken û tovikên wê bi qelandî di xun. |
| **Gulbihar** | (n.l.mê)1.Gulên biharê. 2.Navê jinane. |
| **Gulçan** | (n.dar.nêr) Asinek req û tunde, serê wî xware jibo rakirin û ji hev cudakirina asin, dîwar, dar û htd bi kar di hêt. |
| **Gulçin** | (karn.l.dz) 1. Mirovên gulan di çinin.2. Navê keçane. |
| **Gulçiçek** | (n.dar.mê) Gulçîçek. |
| **Gulçîçek** | (n.dar.mê) Corekê gulane pir reng û di bêhinxweşin. |
| **Gulçîn** | (karn.l.dz) Gulçin. |
| **Guldan** | (n.dar.mê) Amanêd gulan di êxinê. Qafikê gulan . Gulwaz. |
| **Gule** | (n.x.nêr) Berikêd tiveng û topan. : Dujminî gule berdan ser gundê me. |

| | |
|---|---|
| **Gulekalane** | (n.l.mê) Gezînk. |
| **Gulendam** | (hn.l.çewa) Bejinzirav. |
| **Gulexizêm** | (n.l.mê) Corek gulane mîna helalan, gelek reng û corin. |
| **Gulgenim** | (n.l.mê) Gulîya serê genimî ya pire ji dasî û dindikên genimî.Gulîya genimî. Gulî. |
| **Gulgul** | (hn.l.çewa) Kiras yan her tiştê bi reng û mînakên gulan xemlandî, gulgule |
| **Gulgulî** | (hn.l.çewa) Gulgul. .: ***pend*** Gulgulî yê ji mafîrê kême. |
| **Gulik** | (n.dar.mê) Pişkovk. |
| **Gulistan** | (n.dar.mê) Cihê gulan çandinê. Welatê gulan.Baxê gulan. |
| **Gulî** | (n.x.mê, malbn)1. Gula(serkê) genimî. Gulgenim.2. Hozeka (tîre) kurdane li Kurdistana îraqê. 3. Davên pora(pirça) keçikan. |
| **Gulîfk** | (n.dar.mê) Bisk. |
| **Gulînk** | (n.x.mê) ***endamê leş*** Endam ê guhnelî,yê mê, yê mirov(jin) û candara. Koş. |
| **Gulîstan** | (n.dar.mê) Gulistan. |
| **Gulîzar** | (hn,nl.mê) 1.Baxê gulan.. 3.Navê jinane. |
| **Gulîzer** | (hn.l.çewa) 1. Jin (keç) a gulîkên pora wê reng zerin.2. Navê pîrekane. |
| **Gulkelem** | (n.l.mê) Qernabît. |
| **Gulle** | (n.x.mê) Gule. |
| **Gulor** | (hn.x.çewa) Girover. |
| **Gulpik** | (n.dar.mê) 1. Gopik.2 .Pişkovk.3. Lep. Mist. |
| **Gulşen** | (n.dar.mê) Baxê gulan. Gulistan. |
| **Gulte** | (n.x.mê) 1.Stûn. 2. Dareke dirêje digehe bi kefşê mirovî, serê wî bi dareke dî yê kurt mîna pîta **T,** mirovên lenger dixin bin hingilên xwe jibo bi rêve b i çin. |
| **Gultekirin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov stûnekê dixit bin kepir, ban,stêrik û htd dako xwe liber giranîyê bi gire. (K) bn: Kirin. |
| **Gulwaz** | (n.dar.mê) 1. Qeft. Destik. 2.Guldan. |
| **Gulzar** | (n.dar.mê) 1. Baxê gulan.2. Navê jinane. |
| **Gumegum** | (n.dar.mê) ***deng*** Gumgum. |
| **Gumgum** | (n.dar.mê) Dengê top û tivengan. |
| **Gumgumkirin** | (k.jn.gl.mê) Dengê gumgumê jê peyda di be.(K) bn: Kirin. |
| **Gumgumok** | (n.dar.dz) Kimkime. Xemegur. |
| **Gumîn** | (k.jn.x.mê) Teqîn. Peqîn. Gumên. |
| **Gumtil** | (n.x.nêr) Dirgêd axê. Komeka ax, şekir û htd, pêkve nûsayî. ***Pend*** :Zarokê wan mîna gumtilkê şekirê ye.ang; zarokekê hinde şirîn û ciwane. |
| **Gun** | (n.x.nêr) ***endamê leş*** Hendamek cot,guhnelî yê nêrînê giyandarane. |
| **Guncan** | (k.jn.x.mê) Hînbûn. Rahatin. Wekhev.(K) bnn: ez di guncim em di guncîn, tu di gincî hûn di guncin, ew di gunce[…it] ewan di guncin. Pr: Dê[bi] guncim, guncin, guncî, hûn guncin, gunce[…it], guncin. Ddb: di gncam. Di guncay, di guncan.di guncayn. Db,dûr: guncabûm, guncabû, guncabûy, guncabûyn, guncabûn. (F): bi gunce, bi guncin. |

| | |
|---|---|
| **Guncandin** | (k.jn.dar.mê) Xwe li gor kawdanan gihorîn. Guncan. (K) bdn: ez di guncînim em di guncînîn, tu di guncînî hûn diguncînin, ew di guncîne[…it] ewan di guncînin. Pr: dê bi +bdn. Bdb : di guncand, di guncandin.Db,dûr: guncandibû, guncandibûn. (K) : bi guncîne, bi guncînin. |
| **Gund** | (hk.cih..x.nêr) Hijmareka malan bi hevre. Biçûktir ji bajaran. Pend :Gundeke, gundoreke. Ang; dema xwarina (kelûpel) dikêm mirov gelek bin û çi bi kesê ra negehit. |
| **Gundikî** | (hn.dar.çewa) Xelik ê gundan. |
| **Gundirandin** | (k.jn.dar.mê) Tiştê girover girêlkirin. (K) bi gundirîne, bi gundirînin, dê gundirînim,… û htd. |
| **Gundî** | (hn..dar.çewa) 1. Xelik ê gundan. 2. Navê mêran. 2. Kêmzan. Sade. : ***pend*** : Gundî nabin cindî. |
| **Guncîn** | (k.jn.x.mê) Guncan. |
| **Gundor** | (n.x.nêr) Fêqîyekê xweş û şirîne, xire mezine,gelek cor reng hene. |
| **Guneh** | (n.x.mê) Karên ne baş ne çak. Ne rewa. Tawan. :Guneha wî çîye, hewe wesa bi serî îna ?. |
| **Gunehbar** | (hk.dar.çewa) Kesê şaşîyan dijî dînî di ke, yan pêgirîyê bi qanûnê neke. Karê wî guneh. Tawanbar. |
| **Gunehkar** | (hk.dar.çewa) Gunehbar. |
| **Gunehkarî** | (n.l.mê) Guneh. |
| **Gunehkirin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov gunehekê di ke. (K) bn: Kirin. |
| **Gunek** 1 | (n.x.mê) Guneh. |
| **Gunek** 2 | (hn.dar.çewa) ***nexweşî*** Ritlo. |
| **Gungulî** | (hn.dar.çewa) Pir. Tijî. Dagirtî. |
| **Gupik** | (n.x.mê) Gopik. |
| **Gur** | (n.x.dz) Giyandarek kûvî ye,dirindeye, dujminê kewalane.Pend :Bûn gurê çiyan. Ang; bê xwedî bûn. Bê war bûn. :***Pend*** :Gurê dev bi xwîn. Ang; mirovê tore.çavsor. |
| **Guran** | (k.jn.x.mê) Dema pîstê(çerimê)kelexên kewalê serjêkirî bi serda di hînin. Bizin guran.(K): ez di gurêm em di gurêyn , tu di gurêy hûn di gurên, ew di gurêt ewan di gurên. Pr: dê[bi] gurêm, gurêyn,gurêy, gurên,gurêt[..re], gurên. Ddb :di gura, di guran. Db,dûr: Gurabû, gurabûn. (F): bi gure[ê], bi gurên. |
| **Gurandin** | (k.jn.dar.mê) Gihorandin. |
| **Gurc** | (hn.x.çewa) Peyt. Tund. BRX Şor. :Lêvên gurc. Kirasê dehmen gurc. |
| **Gurcbûn** | (k.jn.l.mê) Peytbûn. |
| **Gurckirin** | (k.jn.l.mê) Peytkirin. Tundkirin. :Delingêd xwe gurc bike da bi karî la çemî derbaz bi bî!. |
| **Guregur** | (n.dar.mê) Dengê giregirê. |
| **Gurg** | (nx.dz) Gur.***Pend*** :Hegê dewleta xwe. Ang; kesê bi kêr xwe nehatî. |
| **Gurge** | (n.dar.mê) ***giya*** Corek giyayê ziyandare, di nav werzan da hişîn di be û ziyanê di gehîne çandinê li bax û bîsatanan. |
| **Gurgeh** | (n.dar.mê) Gurge. |

| | |
|---|---|
| **Gurgîn** | (hn.l.çewa) 1. Mirovê dijwar wekî gurgan. 2. Navê mêrane. |
| **Gurgur** | (n.dar.mê) Giregir. Girgir. |
| **Gurî** 1 | (hn.x.çewa) Mirovê bi nexweşîya pîstî di kevit û canê wî kul di bit. |
| **Gurî** 2 | (n.x.mê) Soratîya rengê agirî.Gurîya agirî. Pêt |
| **Gurmên** | (n.dar.mê) Dengê Top, tiveng, evran û htd. |
| **Gurmîn** | (k.jn.x.mê) Gurmîna dengê ewran. Gurmên. |
| **Gurtil** | (n.x.nêr) Gumtil. |
| **Gurz** | (n.x.nêr) 1. Darekê stûr desthile, mirov jibo bervanîkirin û pevçûnan bi kar di hînin. 2. Destik, qef. Gurzekê giyayî. |
| **Gurzdaweşandin** | (k.jn.l.mê) Bi kar anîna gurzî. Lêdana li dijminî. Pêşmergehî gurzekê mezin daweşand dijminî. |
| **Gustîl** | (n.x.mê) Xelekek zêr, zîv, aasin û htd, sade yan bi morî,mirov di xin tilîyêd xwe. |
| **Gustîlk** | (n.x.mê) Gustîl. |
| **Gustîrk** | (n.x.mê) Gustîl. |
| **Guşîn** | (k.jn.x.mê) Givaştin. |
| **Guvandin** | (k.jn.x.mê) Maçîkirin. Maçkirin. |
| **Guvaştin** | (k.jn.x.mê) Givaştin. |
| **Guvişk** | (n.x.mê) Givişk. |
| **Gû** | (n.x.nêr) Bermayîyê xwarinê ko ji paşîya candaran di derkeve. Rîx. |
| **Gûç** | (n.x.mê) Kujî. |
| **Gûfik** | (n.x.mê) Gîfik. |
| **Gûhesin** | (n.dar.dz) Şeytanok. Guhmasî. |
| **Gûhûr** | (n.x.nêr) Gilêş. |
| **Gûjme** | (n.x.mê) ***erd*** Nihal. Dol. Newal. Herivte. |
| **Gûkirin** | (k.jn.l.mê) Rîtin. (K) bn: Kirin. |
| **Gûrî** | (hn.x.çewa) Qurban. |
| **Gûrîbûn** | (k.jn.l.mê) Xwe kirin qurban ji pêxemet karekî. Bû qurban. : Ez gûrî welatê xwe bi bim (K) bn: Bûn. |
| **Gûrîkirin** | (k.jn.l.mê) Qurbankirin. Xwe kirin qurban..: Wî jibo çi xwe kir gûrî?. (K) bn: Kirin |
| **Gûstêrik** | (n.dar.mê) ***candar*** Stêrstêrok. Stêrok. |
| **Gûşî** | (n.x.nêr) Îşî yê tirî. |
| **Gûv** | (n.x.mê) Gov. Axur. |
| **Gûz** | (n.x.mê) ***dara berdar*** Gîz. |
| **Gûzan** | (n.x.mê) Kêrika devxweş. Devik. |
| **Gûzek** | (n.x.mê) ***endamek leşî*** Cot hestîyên liser rexa herdu pêyêd mirovî. |
| **Gûzik** | (n.x.nêr) ***adî*** Kulî. |
| **Gûzîdan** | (k.jn.x.mê) Pêkhatin. Lihevhatin. |
| **Gûnî** | (n.x.nêr) Ferde. Cewal. Cihal. |
| **Gwînî** | (n.x.nêr) Gûnî. |

| | |
|---|---|
| **Gwîrisk** | (n.x.mê) ***giya*** Giyayek biharîye, li çiyan hişîn di be, di hêt xwarin bi kelandin yan zerkirin. |
| **Gwîriz** | (n.x.mê) Gwîriz. |
| **Gwîz** | (n.x.mê) bn :Gûz. |

# H

| | |
|---|---|
| **H** | (he) Pîta dehê ji abeya kurdî. |
| **Ha** 1 | (pêrb) ***rêzman*** Alavê hicmetîbûnê. :Ha; eve kengî wesa çêbû!. |
| **Ha** 2 | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo dan û wergirtinê bi kar di hêt.: Ha ji te ra!. Ha bi gire! Ha were. |
| **Hacan** | (hozn) 1 Hozeka kuçerên kurdane. |
| **Hacanî** | (malbn) Kesê ser bi hozHacan ve. |
| **Hacîre k** | (n.dar.dz) Çûçikeka biçûke reş û sipîye, koçere, li biharan di hên Kurdistanê jibo danana hêk û têjikan. |
| **Haf** | (n.x.mê) Cih. Meydan. Himber. |
| **Hajîn** | (nl.mê) Nîşan dana jînê. Ev jîyane . Jîyan bi vî rengî ye. 2Navê jinane. |
| **Han** | (cihn) ***rêzman*** Cihnaveke jibo kes yan ti_tê dûr bi kar di hêt. Henê.: Tu mirov han yê liser banî di bînî?.:Gundê han. Kevirê han. |
| **Hanê** | (cihn) ***rêzman*** 1. Han. Henê.2. Alavê danê.;Hanê bo te. Hanê wergire. |
| **Har** | (hk.x.çewa) 1.Giyandarê zû tore di bit. Dijwar. Mirovê har. Jina har .Tore. bêhinteng.2. Xwarina har, ang; xwarina dijwar. Tîj. Bîbera har. |
| **Harbûn** | (k.jn.l.mê) 1. Torebûn. Bêhintengbûn. :Seyê ciranî yê har bûye. : ***pend*** Jin ji bê mêrî har di bin, mêr ji bê jinî jar di bin. 2.Bihêz kevtin. Geşkirin. Qelew.:Bacanên me evsale dê har bin. (K) bn :Bûn. |
| **Harî** | (n.dar.mê) Derdê harbûnê. Dijwarî. Tondî. Toreyî. :Harîya bîberan ne wek ya pîvazane. |
| **Harîkar** | (hk.l.çewa) Alîkar. :Xudê harîkar be. |
| **Harîkarbûn** | (k.jn.gl.mê) Bûn piştevan. Bûn alîkar. :Xwedê harîkarê we bit. :Babê min herdem harîkar bû ko ez ez bi xwînim. |
| **Harîkarî** | (n.l.mê) Alîkarî. : Ez pêdivî Harîkarîya te me. |
| **Harîkarîkirin** | (k.jn.gl.mê) Alîkarîkirin. :Heger tu harîkarîya min ya diravî bi key, ez dê xanîyekî bi kirim. |
| **Harîkirin** | (k.jn.l.mê) Digel kar kirin. Jêra karkirin.Piştevanîkirin.:Bê zehmet harî min bike da vî barî danîn ser pişta hespî. (K) bn: Kirin. |
| **Harîvan** | (n.dar.mê) Navê mêrane. |
| **Harkirin** | (k.jn.l.mê) 1.Dijwarkirin. Torekirin. Hêriskirin. :Te ev sege yê har kirî!. 2.Bi hêzkirin. :Bacanên xwe bi lêkirina zibilî har kirin. (K) bn: Kirin. |
| **Hatin** | (k.jn.x.mê) Ji cihekî zivrîn ,vegeryan.***Pend*** :Hat ve dest ji pêyan dirêjtir. Ang; Çi bi destî ve nehat. Armanc bi cih ne hat. ***Pend*** :Çûn bi mirovîye, lê hatin ne. ***Pend*** :Hat dengê duholê, pîrejin negehiştin solê(pêlav). (K) Bdn: ez di hêm em di hêyn(di hên) tu di hêy hûn di hên, ew di hêt ewan di hên. Pr:dê bi + bdn. Bdb: ez di hatim, em di hatîn, tu di hatî ,hûn di hatin, ew(wî, wê) di hat, ewan di hatin. Db,dûr: ez hatibûm,em hatibûyn, tu hatibûy, hûn hatibûn, ew hatibû, ewan hatibûn. (F) :bi hêy, bi hên[were werin]. Brx Çûn. |

| | |
|---|---|
| **Hatî** | (hn.dar.çewa) Vegerayî. Mêvan. Gehiştî. Eve hatîne, kanê çûyî?.***Pend*** :Hatî di çûyîne, xwaztî di birîne. Ang; yê hatî her dê vegerit, ya xwaztî dê her hêt birin. |
| **Havana** | (hk.cih) Paytextê welatê Kûba. |
| **Havanayî** | (malbn) Kelên xwecihên Havana. |
| **Havanî** | (malbn) Havanayî. |
| **Haveyn** | (n.x.nêr) Hêvên. |
| **Havêjtin** | (k.jn.x.mê) Tiştek ji cîyek bo yê din bi bizivit. Firêdan. Firandin. :Kevirek havêjt(havêt). : Cilêd xwe yên kevin havêjtin.:Wê xwezîyê ji mejîyê xo bi havêje.(K) bdn: ez di (havêjim) em di havêjîn , tu di havêjî, hûn di havêjin(havên) ew dihavêt(havêjit) ewan di havên(havêjin).). Pr: dê[bi] havêjim, havêjîn, havêjî, havêjin, havêjit[..je], havêjin. Ddb: di havêjt, di havêjtin. Db,dûr: havêjtibû, … bûn.(F): bi havê(havêje) bi havên(havêjin |
| **Havil** | (hn.x.çewa) 1.Biryar. şirove.2. Navê mêrane. |
| **Havildar** | (hn.dar.çewa) Pêvegirêdayî. Peywenddar.şolejê. : Jibo alîyê havildar,ango cihê peywenddar. |
| **Havî** | (hn.x.çewa) Bajêle. Berela. Teqyayî.Derbider. Aware. |
| **Havîbûn** | (j.n.mê) Derbiderbûn . Awarebûn.(K) bn: Bûn. |
| **Havîkirin** | (k.jn.l.mê) Derbiderkirin. Derêxistin. Awarekirin. |
| **Havîn** | (hk.dem,n.x.mê) 1.Wezek salê ye, germtirîn werze, ji mehên xizîran, tîrmeh û tebaxê pêk tê.2. Navê keçane. ***Pend*** :Havîn daybabe, havîn malbabe.ang; li havîna pir corên fêqîyên xweş hene û li her der erzanî ye. |
| **Havîngeh** | (hk.cih,n.dar) Cihê fênik û dilveker , mirov jibo derbazkirina demên xweş lê di mînin. Cihê bêhinvedana havînan. Havîngeha Siyaretîka. Havîngeha gelîyê elîbeg. Havîgeha Sersikî. :Havîgehên welatê me pirin. |
| **Havînvan** | (n.dar.dn) Navê jin û mêrane. |
| **Havîvan** | (n.dar.dz) Navê keç û xortane. |
| **Havlêk** | (n.x.nêr) Firçe. |
| **Hawar** 1 | (n.x.mê) 1.Dema mirov daxwaza alîkarîyê di ke. Gazî. Hewar. 2. Navê mêrane. |
| **Hawar** 2 | (pêrb) ***rêzman*** Alavê keserê ye. |
| **Hawarhatin** | (k.jn.l.mê) Weke mirov di hana yekî bi çe dema di |
| | keve tengavîyê. |
| **Hawargehandin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov hawarê bi gehînit kesek, yan desteyekê ko di hana mirovî bi hên li demên tengav. |
| **Hawarkirin** | (k.jn.l.mê) Daxwazkirin alîkarîya lezgîn, bi deng, nivîs yan ragehandin.Qîjandin. Gazîkirin li dema tirsê,jibo di hanê hatin. (K) bn: Kirin. |
| **Hawêr** | (hk.cih) Rex. Al. Dewrûber.Rexûçan. |
| **Hawêrdor** | (hk.cin.n.dar.mê) Rexûçan. Derûdor. :Dujminî hawêrdora me girtine. |
| **Hawîr** | (hk.cih) Hawêr. |
| **Hawîş** | (hn.x.çewa) Tena . Bêdeng. :Zarokê hawîş. |
| **Hawîşbûn** | (k.jn.l.mê) Tenabûn. Bêdengbûn. : Kuro te çiye, dê hawîş bi be!. |

| | |
|---|---|
| **Hawîşkirin** | (k.jmê) Dmoşkirin. Tenakirin. :Dayê zaroyê xwe hawîş di kir. (K) bn :Kirin. |
| **Hay** | (n.x.mê) Ageh. Zanîn. :Haya min jê tune. :Min hay jê nîne. |
| **Haydar** | (hn.n.dar. çewa) Agehdar. :Mamosta got: gelî qutabîyan hûn di haydarin ko sibe me seyrane?. |
| **Haydarbûn** | (k.jn.gl.mê) Agehdarbûn. Zanîn. :Ez bi çi biryaran haydar nebûme!. |
| **Haydarî** | (n.dar.mê) Agehdarî. |
| **Haydarkirin** | (k.jn.gl.mê) Aghedarkirin. .:Her gihorîneka bi bit ez dê we haydar bi kim. |
| **Hayjêbûn** | ( k.jn.gl.mê) Ageh jê hebûn.. Agehdarbûn. . :Haya te ji wî zarokî hebe. |
| **HD** | (kurt) Heta dawîyê. Heta domahîyê. |
| **Hebûn** | (hkmê.k.jmê) 1. Mirovî tiştek hebe. Çîrok :Hebû, tunebû,…. Pîrjinek hebû. :Wê pênc zaro hene. : Te çi heye ji me ra bi bêje. 2. Amadebûn. :Hebûna te li vê dirê giringe. Brx Tunebûn. Nebûn. |
| **Hechecik** | (n.dar.dz) Hacîreşk. |
| **Hecimîn** | (k.jn.x.mê) Tenabûn . Hawîşbûn. :Ev çi zaroye, li cihekî na hecime!. (K) bdn : ez di hecimim em di hecimîn, tu di hecimî hûn di hecimin, ew di hecime[..it] ewan di hecimin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : ez di hecimîm, em di hecimîn, tu, ew di hecimî, hûn, ewan di hecimîn.Db,dûr :Ez hecimîbûm, em hecimîbûyn, tu hecimîbûy, hûn hecimîbûn, ew hecimîbû, ewan hecimîbûn(bibûn ). (F): bi hecime bi hecimin. |
| **Heçik** | (n.x.mê) Darekê duçeqe(ta) di êxin serekê werîsî dako jibo girêdana baran sanahî bi be. |
| **Hedar** | (n.x.mê) 1. Aramî. Bêhinfirehî. 2. Navê jinaye. |
| **Hedarhatin** | (k.jn.l.mê) Hewyan.Hawîşbûn. Tenabûn. Rihetbûn.. :Hedara min li çi diran nahêt:Hedara wî li vêrê nahêt. (K) bn : Hatin. |
| **Hefik** | (n.x.mê) ***leş*** Gerden. Gerî. :Hefka wî ya kul bûy. |
| **Hefqas** | (pêrb.dar) ***rêzman*** Hinde. Hindî. Temet. |
| **Hefsar** | (n.dar.nêr) Serlixafa dewaran. Cilew. Devgem. :Hefsarê kerî di ser da hat. |
| **Hefsarkirin** | (k.jn.gl.mê) Mirov hefsarî di xin serê dewaran. : Min hespê hefsar kirî dako bi herim daran. |
| **Heft** | (hijn.çend) Hijmareke 1+6 =7 . 10-3= 7. |
| **Hefte** | (hk,dem.mê) Heft rojin. : êkşemb, duşemb, sêşemb, çarşemb, pêncşemb, eynî(în), ; şembî,. Çar hefte di bin mehek. |
| **Heftem** | (hijn.çend) Hijmareke heger hefit bin , jibo ya dawî yê dihêt gotin. Ya/yê hefit ê. Hefit car bû, kirin. Roja heftem. Cara heftem. |
| **Heftemîn** | (hij,n) Ya hefit ê. Heftem. |
| **Heftê** | (hijn.çend) Hijmara .70 , 7×10=70. |
| **Hefthizar** | (hijn.l.çend) Hijmara 7000. 1000×7=7000. |
| **Heftiyar** | (n.x.dz) ***candar*** Giyandarek dirindeye, şîrdere. Keftar. |
| **Heftî** | (hk,dem..mê) Hefte. |
| **Heftmilyon** | (hijn.l.çend) Hijmara 7000000. |
| **Heftreng** | (n.l.mê) Keskesor yê ji heft rengan pêkhatîye, li dema barana hûr yan hebûna xunavê peyda dibe, ko rengêd rojê berevajî di ke; sor, pirteqalî,zer,kesik,esmanî,şîn û mor. Kelestûn. |

| | |
|---|---|
| **Heftsed** | (hijn.çend) Hejmara 700. 100×7= 700. |
| **Heger** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke di hevekanda wek merc bi kar di hêt. Eger. :Heger tu hatî, ez jî dê hêm. : Heger min bi zaniba tu li virî, ez ne hatim. |
| **Hej** | (n.x.nêr) Çeqên çir û tijî yêd daran. Tayên daran. :Bi hejî agir vemirand. |
| **Hejandin** | (k.jn.x.mê) Leqandin. Livandin. Livlivandin. :Ala hejandin. :Serê xwe hejand. (K) Bdn:ez di hejînim em di hejînin, tu di heînî hûn di hejînin, ew di hejîne{…it] ewan di hejînin. Pr: dê bi + bdn. Bdb: di hejand, di hejandin. Db,dûr: hejandibû, …bûn. (F): bi hejîne bi hejînin. |
| **Hejar** | (hn.x.çewan) 1. :Mirovê hejar,ang; mirovê kêm mal û pare. Belingaz. Jar. ***Pend*** :Mirovê bêmejî hejare, ne yê bê mal û pare. 2. Navê mêrane. |
| **Hejarî** | (n.dar.mê) Belingazî. Neyî. ***Pend*** :Derdê hejarîyê pir girane. ***Pend*** :Mirin heba, lê hejarî tune ba. |
| **Hejan** | (k.jn.x.mê) bn: Hijyan. |
| **Hejdeh** | (hijn.çend) Hijmara 18. 20-2=18. |
| **Hejdehem** | (hijn.çend) Ya, yê, yên hejdeyê. |
| **Hejdehemîn** | (hijn.çend) Hejdehem. |
| **Hejdehizar** | (hijn.çend) Hijmara 18,000. |
| **Hejdemilyon** | (hijn.çend) Hijmara 18,000,000. |
| **Hejhejok** | (hk.dar.çewa) Tiştê yan mirovê, di heje. Sist. Xav. Livlivok. Leqleqok. |
| **Hejî** | (hn.x.çewa) Rêzdar. Bi rûmet. Mirovek hejîye ; mirovek berkevtî, bi rêz. Hêja. |
| **Hajîn** | (k.jn.x.mê) 1. Leqîn. Livîn.Hijyan.2.Navekê nêr û mê ye. |
| **Hejmar** | (n.x.mê) Zanîna hijmartinan. Nîşana rêzkirin û hijmartinê1,3,4,5,7, …û htd, komkirin, parvekirin, jihevbirin û lêkdan. |
| **Hejmartin** | (k.jn.x.mê) Hijmartin. : Kî di kare xwendekaran di polê da bi hejmêre?. |
| **Hek** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo dem hicmetîbûnê(seyr) bi kar di hêt.:Hek eve tuyî li vêrê?. |
| **Hekar** | (hk.cih.devern) 1. Devereke li Kurdistana bakûr. 2. Navê mêrane. |
| **Hekarî** | (hkc.malb,ndar.dz) 1. Hekarî ,devera hekarî.2. Hekarî, devoka ko li devera hekar pê di axivin. 3. Hekarî, xelkê devera hekar ê. |
| **Heke** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê mercê. Eger. Heger. Heker. |
| **Hel** | (n.x.mê) 1. Derfet. Delîve. : Ez bi hel dizanim ko em biçîn seredana hevalê xwe li xestexanê. 2. Car. :Vê helê ez dê bi ezmûna dawîyê bi serkevim. |
| **Helan** 1 | (n.x.nêr) Kevirê pan, hulî û mezin. :Mala wan liser helanekî ye |
| **Helan** 2 | (k.jn.x.mê) Helyan. Bihojîn.:Qerîse di hele. Nîvişk li ber germê helîya. .(K) bdn :ez di helim em di helîn, tu di helî hûn di helin, ew hele[...it] ewan di helin. Pr :dê [bi] +bdn. Bdb : ez di helam, em di helayn, tu di helay hûn di helan, ew di hela ewan di helan. Db,dûr : ez helabûm em helabûyn, tu helabûy hûn helabûn, ew helabû ewan helabûn.[bi bûn]. (F) : bi hele, bi helin. |
| **Helan** 3 | (k.jn.x.mê) Derkeftin. Helhatin. Xuyabûn. :Roj di helêt. |
| **Helandin** | (k.jn.x.mê) Dema mirov tiştekî(rûn) bi gerimkirinê bi helîne.:Qeşê bi helînin. :Te dilê min heland, dê vebire!. (K) bdn: Ez di helînim em di |

| | |
|---|---|
| | helînîn, tu di helînî hûn di helînin, ew dihelîne[…it] ewan di helînin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : di heland, dihelandin. Db,dûr:Helanbibû, helandibûn.(F) :Bi helîne, bi helînin. |
| **Helandî** | (hk.dar.çewa) Tiştê hatî helandin. Bihojandin. Rûnê helandî. |
| **Helanîn** | (k.jn.x.mê) 1. Parastin. 2. Veşarin. Veşartin. Varêkirin. |
| **Helar** | (n.x.mê) Gurî ya agir. Pêt. |
| **Helat** | (n.x.mê) 1.Kiryara dema derbaz ya (helatin) . Xuyabûn. Diyarbûn. Derkevtin. Roj helat. 2.Nave jinane. |
| **Helatin** | (k.jn.x.mê) Derkeftin. Xuyabûn. Diyarbûn. :Roj li spêdeyan di helêt. |
| **Helbest** | (n.dar.mê) Derbirîna hizran bi awayek selîqe û dilveker.Hozan. Riste. :Me guhdarîya helbesta seydayî di kir, pir dilveker bûn. |
| **Helbestin** | (k.jn.dar.mê) Girêdan. Bestin. Vehandin. Ristin. Rêzkirin. |
| **Helbestvan** | (pîşn.dar.dz) Kesê helbestan di vehînit. Hozanvan.:Helbestvanî dîna xwe ya êkê da çapkirin. |
| **Helbestvanî** | (karn.dar.mê) Karê nivîsan û vehandina helbestan.:Ew bi helberstanî yê ve xerîke. |
| **Helbet** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê misogerkirinê.1.Çi pê nevêt. Bêgoman.2. Erê. Belê. : Sube dê çiye xandingehê? helbet dê çim!. |
| **Helbijartin** | (k.jn.dar.mê) Weke mirov kesekî jibo karek yan berpirsîyekê ji nav çend kesan bi bijêre dengê xwe jêra bide dako nûnerîya mirovî bi ke. :Mirov tiştekî ji çendêd din bigire.:Sube dê helbijartinêd bajarvanî dest pê bi kin. (K) bn: Bijartin. |
| **Helbijêr** | (n.dar.dz) Berbijar. |
| **Helbirîn** | (k.jn.x.mê) Helgirtin. Rakirin. Hilandin.Hilgirtin. |
| **Helçinandin** | (k.jn.dar.mê) Malîn. Pakijkirin. Vemalîn. |
| **Helçinîn** | (k.jn.x.mê) 1. Pakijkirin.2. Alizîn. |
| **Heldan** | (k.jn.x.mê) Bilindkirin. Rakirin. Helgirtin. : Serê xwe heldan. Ala heldan.(K) bn :Dan. |
| **Heleşe** | (hk.x.çewa) Mirovê xemsar yê her tiştê bi keve destan xirab di ke. |
| **Helgirtin** | (k.jn.x.mê) Hilgirtin. |
| **Helhelan** | (k.jn.dar.mê) Qîjandin. Hewarkirin. |
| **Helhelok** | (n.dar.mê) 1. Dareka(tiraş) dême bi bere. 2. Berê helhelokê , fêqîyeke xir û biçûke pir reng hene , sor ,zer, htd, tama wan şirîn û xoşe. |
| **Helhilîn** | (k.jn.dar.mê) Helyan. Bihojîn. |
| **Helisandin** | (k.jn.dar.mê) Hulisandin. Tehisandin. Hilîkirin. |
| **Helisîn** | (k.jn.x.mê) Hulisîn. Tehisîn. |
| **Helişkandin** | (k.jn.x.mê) Bêgavkirin jibo gotin yan kirina karekî. Pêdan kirin. Pêdan gotin. Azirandin. :Tu mijarê helişkîne û ji werê wêve xema min.(K) bdn: ez di helişkînim em di helişkînîn, tu di helişkînî hûn di helişkînin, ew di helişkîne [...it] ewan di helişkînin. Pr: dê [bi]+bdn. Bdb: di helişkand, di helişkandin. Db,dûr: helişkandibû, helişkandibûn. (F): bi helişkîne, bi helişkînin. |

| | |
|---|---|
| **Heliz** | (n.x.mê) ***giya*** Giyayek ter û bi xemle, li çiyayên Kurdistanê hişîn di be, xwarineka baş a kewalî(terşî) e.2. Navê jinane. |
| **Helîkopter** | (n.biyan) Firokeka bi perwaneye, cengî yan jibo karên sivîl mîna veguhaztina nesax, birîndaran û çandinê bi kar di hêt. |
| **Helîme** | (n.x.mê) Hilim. |
| **Helîmegirtin** | (k.jn.l.mê) Hilimgirtin. |
| **Helîn** | (k.jn.x.mê,n.x.mê) 1. Helyan. Helan. Bihojîn. 2.Nave jinane.3. Hişyarbûn. Rabûn ser xwe. Desthelîn. Desthelan. 4.Hêlan. |
| **Helîse** | (n.x.mê) Xwarina ron. Avik. Metfînî. |
| **Helkeft** | (n.l.nêr) 1. Bûyera ko bê zanebûn rû di det.2.Navê mêrane. |
| **Helkeftin** | (k.jn.dar.mê) Haelkeft. |
| **Helkehelk** | (n.dar.mê) Li dema westanê yan tirsê bêhina mirovî lezgîn di hêt û di çit. Hilkehilk. |
| **Helkehelkkirin** | (k.jn.gl.mê) Ji egera nexweşî, tirs yan westanê dengê helkehlkê ji mirovî di hêt. (K) bn :Kirin. |
| **Helketin** | (k.jn.l.mê) Helkevtin. |
| **Helkevtin** | (k.jn.l.mê) 1.Bîranîn. Bîrewerî.2. Serkevtin. Serevazbûn. Bilindbûn. |
| **Helkirin** | (k.jn.dar.mê) 1.Pêkirin. Agir, cigare, lempe helkirin.2. Hilkolan. Kolan. Kêlan. Zevî hel kir. 3. Kêşan û alandin.:Bendik hilkirin. : Davê bi kêşe û di darîhel bi ke. (K) bn: Kirin. |
| **Helkişandin** | (k.jn.dar.mê) Tiştekî, (dav, werîs, bendik) mirov jiboalîyê xwe ve bi kêşe. Anînder. Înander : Nojdarî didanê wî helkişand. (K) bn :Kişandin. |
| **Helikîn** | (k.jn.x.mê) Helkehelkkirin. (K) : bdn: ez di helikim, em di helikîn, tu di helikî hûn di helikin, ew di helike[..it] ewan di helikin. Bdb: ez di helikîm, em di helikîn, tu di helikî, hûn di helikîn, ew di helikî ewan di helikîn. Db,dûr: helikîbûm,…bûyn,..bûy,…bû,… bûn. (F): bi helike, bi helikin. |
| **Helkulîn** | (k.jn.dar.mê) Gavhavêtina xwarûvîç. Lengîn. : (K) di helkulim di helkulî, di helkulîn, di bi helkulim, bi helkule :Çima di helkulî, ma pîyê te birîndare?. |
| **Helkutan** | (k.jn.dar.mê) 1. Pêyêd xwe liser erdê rakirin û danan, nemaze dema di qerimin[ji serma]. 2. Hêriş kirin ser malan. Kevtin nav. |
| **Helm** | (n.x.mê) Hilim. |
| **Helmeşyan** | (k.jn.dar.mê) Bi ser gir û çiya kevtin. Pêveçûn jibo serî. Serevrazbûn. |
| **Helmet** | (n.x.mê) Hêriş. Pêşveçûn. Kiryar. |
| **Helmêjk** | (n.dar.nêr) Lûleyeka kune, jibo veguhaztina şileyan ji amanekî bo yê din. Sondeyê avê. Merpîç. |
| **Helo** | (n.x.nêr) 1.Teyrê kelexan. Elho.2. Navê mêrane. |
| **Helpehelp** | (n.dar.mê) Helkehelk. |
| **Helpehelpkirin** | (k.jn.gl.mê) Helkehelkkirin. |
| **Helpîvan** | (k.jn.x.mê) Dijûndan. Xebergotin. (K) bn :Pîvan. |
| **Helsengandin** | (k.jn..dar.mê) Tiştê ko taqî bikey bizanî kanê base yan ne. Nirxandin. :Karê me bi diristî hat helsengandin!. |
| **Helişandin** | (k.jn.x.mê) Xerakirin. Kavilkirin. Hilweşandin. Herifandin. |
| **Heltûtan** | (k.jn.dar.mê) Çarmêvankî rûniştin. (K) : Heltûte, heltûtin, dê bi heltûte. |

| | |
|---|---|
| **Helûje** | (n.x.mê) 1. Hilîk. 2. Helhelûk. |
| **Helweşandin** | (k.jn.dar.mê) Ji navbirin. Pûçkirin. Xirabkirin. Herifandin. : Biryara rijêmê hat heweşandin. (K) bn: Weşandin. |
| **Helxe** | (n.x.mê) Tirane. Gelte. Yarî.Henek. |
| **Helyan** | (k.jn.x.mê) Tiştê bi gerimkirinê ron bi bit. Bihojîn. :Ron helya. |
| **Hem** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo zêdebarîkirinê bi kar di hêt. : Hem zelaman û hem jinan pişkdarî di govendê da kirin. |
| **Hema** | hema (pêrb)1. Rikatî yan rijdî liser biryara xwe. Jiber ku.: Te çima weha kir? Hema !. 2. Jibo vebirînê bi kar di hêt. : Hema tu ne axive! Hema bêje. Hema bila we li te bi hêt, tuyê hejî wê yekî yî. |
| **Hemahema** | (pêrb.dar) ***rêzman*** Ew qas. Wesa. Kêmkêm. |
| **Heman** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê wehevîkirin. Mînakî. Tiştê mîna yê berî xwe bit, wek wî be. Êvarî ez li mal bûm min ça di vexwar, li heman dem temaşey filmekî di kir. Heman dem. Heman car. |
| **Hemayîl** | (n.x.mê) 1. Corekê ristik[zincîrên] zêr yan zîvî ye.2. Niviştî.Bazbend. |
| **Hembajêrî** | (n.l.dz) Mêr yan jina xelik ê/a heman bajêrê mirovî bit.: Ew hembajêrîyê mine; ango ez û ew ji yek bajêrîn. |
| **Hember** | (hk,cih.n.dar) Li alîyê din.Beramber. Berhember. : Mala mezinê gund li hember mizgeftê ye; ango berêd wan[malan] li êkin. |
| **Hembêz** | (n.x.mê) Bermil. Des li mil. Li kêlek. Li singî. |
| **Hembêzkirin** | (k.jn.l.mê) Dema du kes singên xwe di gehînin êk û bi destan li navmilên devdu dixin.Dest li milêd hev xistin. Xwe di êk werkirin. Pîrozkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Hemdem** | (hn.l.çewa) Mirov yan tiştê di gel demî di guncit. Serdem. Pêşvero. Nûxaz. Hevçerx. |
| **Hemêz** | (n.x.mê) 1.Piştî. Bermil. Gurz.2. Hembêz. |
| **Hemêzkirin** | (k.jn.l.mê) Hembêzkirin. |
| **Hemgundî** | (hn.l.çewa) Gundîyên hev. Gundîyêd êk. |
| **Hemî** | ( hn,nediyar) 1 Giştî. Vêkra. 2. Her. : Ez hemî roja di çim geryanê. Hemû. |
| **Hemnav** | (hn.l.pir) Kesên navên wan mîna hev. Yên navêd wan wek êk. |
| **Hemû** | (hn.nediyar) Giştî. Hemî. : ***pend*** Hmû tişt bi ziravîyê di pirçit, lê kutekî bi storîyê.***pend*** :Hemû zikan xwarin divên, hemû bejinan cilik divên. ***pend*** Hemû tişt dirone, merc çav û birone. |
| **Hemwelatî** | (hn.l.çewa) Xelikê heman welat. Hevwelatî. |
| **Henar** | (n.x.mê) ***fêqî*** Hinar. |
| **Henase** | (n.x.mê) Bêhin. |
| **Henasedan** | (k.jn.l.mê) Ba ji singî[sîh] derkevtin. |
| **Henasegirtin** | (k.jn.l.mê) Ba kevtin nav singî[sîh]. |
| **Hendef** | (n.x.nêr) ***erdzanî*** Gir. Girik. Mil. |
| **Hene** | (n.biyan) Xena. |
| **Henek** | (n.x.mê) Gelte. Helxe. Tirane. |
| **Henekkirin** | (k.jn.l.mê) Tiranekirin. Geltekirin. :Heneka jibo zarokan bi ke, dako tena bi bin. :Ew hertim henakan di ke. (K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Hengame** | (n.x.mê) Dengûdor. Hera. |
| **Hengav** | (n.dar.mê) 1.Demek kurt. 2.Pêngav. |
| **Hengil** | (n.x.mê) ***leş*** Hingil. |
| **Henîşk** | (n.x.mê) ***leş*** Enîşk. |
| **Her** | (pêrb) ***rêzman*** Alavekê pêvegire jibo destnîşankirinê bi kar di hêt. Her kes. Her tişt.Herdem. ***pend*** : Her kesê keçek nazand, wî gundek bezand. ***pend*** : Her teyrek û refa xwe, her kes û welatê xwe. ***Pend***: Her evrazîyek nişîvîyek li dû ye. ***Pend*** : Her pez û pêpikên xwe, her mirov û kiryarên xwe.***pend*** :Her kesê bi lezîne, dê çerxa xwe bizdine.***pend*** : Her kezîzerekê simbêlsorek heye. ***pend***: Her rondikek jibo çavê kul geleke. |
| **Hera** | (n.x.mê) Dengûdor. Qêreqêr.Gêleşok. |
| **Hercar** | (pêrb.dem) ***rêzman*** Alavê cendbarekirina bûyeran. Hemû caran. |
| **Herçend** | (pêrb) ***rêzman*** 1. Hindî. Sereray.Çiqas.2. Lê. Jibilî ku: Herçend min pêkol kir ko bi hêm cem te, ez ne şiyam. : Herçend min ne di xwazt bi çim, lê min çi rê nebûn. |
| **Herdem** | (pêrb) ***rêzman*** alavê berdewamîyê. Hemû deman. Hergav. : Herdem tu li bîra minî. |
| **Herder** | (pêrb.cih) ***rêzman*** Alavê hebûnê(mişebûn). Her cih. Her war. Her alî. : Li herder dengê kewan di hêt.Herdu , hersê, herçar û htd;alavê wergirtin, pejirandina hemûyan. Dema mirov du,sê, çar û htd, tiştan, kesan, gotinan û htd di helbijêrit. :Te sêv yan hinar divê? Herdu; ango sêv û hinar divê. |
| **Hereşe** | (n.x.mê) Gef. |
| **Hereşekirin** | (k.jn.l.mê) Gefkirin. |
| **Herewez** | (n.x.mê) Zibare. |
| **Herê** | (pêrb) ***rêzman*** 1.Alavê erêkirin, pejirandin. Erê. Başe. : Tu hatî?; Herê ez hatim. 2. Alavê hicmetîbûnê. :Herê kuro eve tu li vir çi di kî?. |
| **Herêk** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê desnîşankirin Herkes. Heryek. Êk êk. : Herêk ji we 10 dînaran bi hînin, da em tepeyekê bi kirin.: ***pend*** Herêkî dîkilê wî yê di bin kevşê wî ve. Ang; herêkî nihênî yek li cem heye. |
| **Herêm** | (hk.cih) 1.Deverek mezin. Herêma Kurdistanê. 1. Navê jin û mêrane. |
| **Hergav** | (pêrb.dem) rêzman Alavê berdewamîya demîye. Hemû gavan. Hemû deman. |
| **Herho** | (pêrb.l) ***rêzman*** Alavê hevberkirinê, nîşadanê. Her hosa. Hosa. Wesa. |
| **Herhosa** | (pêrb.l) ***rêzman*** Hosa. Ha hosa. Herdem hosa. |
| **Herifandin** | (k.jn.dar.mê) Dema mirov tiştekî,avahîyekîtêkûpêk bi de. Kavilkirin. Xerakirin. Wêrankirin. :Dîwar herifand. .(K): bdn: ez di herifînim em di herifînîn, tu di herifînî hûn di herifînin, ew di herifîne[..it] ewan di herifînin. Pr:dê bi+ bdn. Bdb : di herifand, di herifandin. Db,dûr: herrifandibû, …bûn.(F): bi herifîne bi herifînin. |
| **Herifîn** | (k.jmê) Kavilbûn. Wêranbûn. Hirgumîn.:Xanîyê kevit herift.:Dîwar herift. |
| **Heriftin** | (k.jn.x.mê) Herifîn. |
| **Herimandin** | (k.jn.dar.mê) Pîskirin. Gemarkirin. Bênivêjkirin.:Zarokî xwe herimand. ***Pend*** : mastê segî herimadî, her jibo wî başe. (K) bdn: ez di herimînim em |

| | |
|---|---|
| | di herimînîn, tu di herimînî hûn di herimînin, ew di herimîne[..it] ewan di herimînin. Pr: dêbi + bdn. Bdb : di herimand, di herimandin.Db,dû herimadibû, …bûn. (F) : bi herimîne, bi herimînin. |
| **Herimî** | (hn.dar.çewa) Gemar. Gelek pîs. : Ew mirovek herimî ye. |
| **Herimîn** | (k.jn.x.mê) Pîsbûn. Gemarbûn. : Av herimî. Cilik di herimin,. |
| **Heriş** | (n.x.mê) ***rêçal*** Firo. Firî. |
| **Herişandin** | (k.jn.mê) Mirov tiştekî yan cihekî bi givêşe taşêweyekê dî di girePerçiqandin.Pelixandin.(K) bdn: di diherişînim em di herişînîn, tu di herişînî hûn di herişînin, ew di herişîne[…it] ewan di herişînin.Pr: dêbi +bdn. Bdb: di herişand, di herişandin. Db,dûr: herişandibû, herişandibûn. (F): bi herşîne, bi herişînin. |
| **Herişîn** | (k.jn.x.mê) 1Têkçûn, guhorîna şêyê tiştî. :Tirombêla wan ya herişî. Pelixîn.2. Peydabûna şûnwarê gurzekî li ser leşê mirovî. 3. Bi gotinên kirêt û birîndarkirina deronî mirov di herişe.(K)bdn:ez di herişim em di herişîn, tu di herişî hûn di herişin, ew di herişe [..it] ewan di herişin. Pr:dêbi +bdn. Bdb: ez di herişîm em di herişîn, tu di herşî hûn di herişîn, ew di herişî, ewan di herişîn. Db,dûr: hrişîbûm,..bûyn,..bûy,..bûn, ..bû,…bûn. (F) bi herişe, bi herişin. |
| **Herî** | (n.x.mê) Ax û ava têkhelkirî a reng û şêweyek taybet di girit. Teqin. Khur(qur). |
| **Herîkêl** | (n.l.mê) Kêlana zevîyên birincî di nav herîyê da, piştî erdî pir av di ken û bi dewaran û amêran di kêlin. |
| **Herîkêlkirin** | (k.hn.gl.mê) Kêlana zevîya jibo çandina birincî, bi herîkêlê. (K) bn:Kirin. |
| **Herîkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov herîyê jibo avayîyan çê di ke. : Me herîya kirî dê sube libinan birîn.Teqinkirin. :Me dîwarê xanî herî kir. (K) bn: Kirin. |
| **Herîn** | (k.jn.x.mê) Çûn. (K) bdn: ez di herim em di herîn, tu di herî hûn di herin, ew di here[…it] ewan di herin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : ez di herîm tu di herî, em,hûn di herîn, ,..Db,dûr: Herîbûm,..bûy,..bûyn,… bûn. : Çûn pitir bi kar di hêt. |
| **Herîse** | (n.x.mê) bn :Helîse. |
| **Herkes** | (pêrb.l) ***rêzman*** Alaveke jibo kesê nediyar. :Herkes di karit pişikdarî ahengê bi bit. |
| **Hermê** | (n.x.mê) ***fêqî*** Hirmîk. |
| **Hermî** | (n.x.mê) ***fêqî*** Hirmîk. |
| **Herro** | (hk.dem.kengî) Çendbarebûna bûyeran. Rojane. Herroj. |
| **Herroj** | (hk,dem) Hemû rojan. : Herroj ez demhijmêrekê dilîzim(werziş di kim). |
| **Hertim** | (hk.dem) Herdem. Hergav. |
| **Hertişt** | (n.l.nêr) Hemû tişt. : Li malê hertişt li cihê xwe ye. |
| **Herweha** | (pêrb.l) ***rêzman*** Alavê çendbarekirinê. Alavê li ser zêdekirinê. Herhosa. Herwesa. |
| **Herwekî** | herweko (pêrb.l) ***rêzman*** Her wek. Mîna. Bo nimone. Wek ya din. Wek ya hatî gotin, kirin. |
| **Herwesa** | (pêrb) ***rêzman*** Herhosa.Herweha. |

| | |
|---|---|
| **Heryek** | (pêrb.desnîş) ***rêzman*** Herêk. |
| **Herzalik** | (n.x.mê) Kepir. Kolik. Zincik. |
| **Heshesok** | (n.dar.nêr) ?axê candaran Qoç. |
| **Hesin** | (n.x.nêr) ***kanza*** Asin. :Ew mîna hesin qayîme. ***Pend*** :Hesin ji hesin na xwe. |
| **Hesingêr** | (pîşn.dar.dz) Asinger. |
| **Hesingerî** | (karn.dar.mê) Karê çêkirin û lêkdana asinî. Asingerî. |
| **Hesinî** 1 | (hn.dar.çewa) Mirovê serreq mîna hesin. Tiştê wek asinî req. |
| **Hesinî** | (malbn) Tîreyeka kurdane. |
| **Hesinkar** | (pîşn.dar.dz) Asinger. Hesingêr. |
| **Hesinkarî** | (karn.l.mê) Karê çêkirina hesin. |
| **Hesk** | (n.x.mê) Heskîv. |
| **Heskîfk** | (n.x.mê) Heskîvk. |
| **Heskîvk** | (n.x.mê) Kefçikek mezine jibo têkvedan yan rwîkirina xwarinê bi kar di hînin. |
| **Hesp** | (n.x.nêr) ***dewar*** Giyandarek malî yan kûvî ye, mezine jibo siwarbûn û bar veguhaztinê bi kar tê, hêmaya hêzê ye.: ***pend*** Hesp kirî zîn divê, zîn kirî siwar divê. ***Pend*** :Hespê bi zîn bê siwar nabe, newala kûr bê av nabe.***Pend*** : Hesp hat ber nalkirinê, kêvjaleyî pîyê xwe bilin di kir;ang kesê ji hêza xwe mezintir bi xwe didanit. ***Pend*** : Hesp û qesp li nik wî êkin: ang; yê merd, çi bi de mêvan û biraderan li nik wî her kême.***Pend*** :Mîna hespê fale.ang; mirovê bi hêz dijwar. |
| **Hespêreş** | (n..l.nêr) ***kevin*** Navê hespekîye di dastana sîsebanê da. Borê reş |
| **Hespkêderya** | (n.l.dn) Giyandarekê avîye biçûke, wek hespane. |
| **Hesret** | (n.x.mê) Kovan. Dax. Fîxan. |
| **Hest** | (n.x.mê) 1.Tiştê mirov ne bîne û pê di zane. Hesta tam, gerim,sar, û htd. 2. Soz. |
| **Hestbirîndarkirin** | (k.jn.gl.mê) Dilşikandin. Gêwilşikandin. Êşandin. :Te hesta min birîdar kir, bi wan gotinên kirêt. |
| **Hestkirin** | (k.jn.l.mê) Wekî mirov hest bi gorînên rex û çanan diket. Pê di zane. :Ez hest bi dilxweşîyê di kem demê te di bînim. |
| **Hestan** 1 | (k.jn.x.mê) Rabûn. |
| **Hestan** 2 | (n.x.mê) Sitranên koçik û dîwanan. Lawik. Heyran. |
| **Heste** | (n.x.mê) Mekîna agir hilkirinê. : Ka hesteya xwe bi de min da cigara xwe pê berdemê(hil bi kem). |
| **Hestî** | (n.x.nêr) ***leş*** Hedamê leşîye, req yê ko laşê mirov û candaran peyt di ke û liser hatîye ragirtin.. Hestîyê canê mirovî pitir ji 600 pirtan pêkhatîye. ser, ling, zend, û htd. |
| **Heş** | (n.x.mê) Hiş Hizir. Bîr. |
| **Heşîn** | (hn.x.çewa) ?în. Hişîn. Dareka hişîn,ango; dareka bi xemil û bi ta, çeq û belg. |
| **Heşînatî** | (n.dar.mê) Xemila kesik ya darûbar û giyayî. ?înkatî. |

| | |
|---|---|
| **Heşînbûn** | (k.jn.l.mê) Dema dar, giya bi tovî yan nemamkan hişîn û geş di bit. ***Pend*** : Dara Azadîyê bi xwînê hişîn di bit. ***Pend*** :Cotkaro çiye di çînî?, ;heger hişîn bû bê (bi) bînî!. (K) bn: Bûn. |
| **Heşînkirin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov giya yan darekê di çîne û hişîn di be.(K) bn: Kirin. |
| **Heşkirin** | (k.jnl.mê) Hestkirin. |
| **Heşt** | (hijn.çend) Himara 8. 4+4= 8. |
| **Heştdeh** | (hij,n.l) Hijmara hejde. 18. |
| **Heştem** | (hij,n,rêzkirin) Ya/ yê / yêd heştê. |
| **Heştemîn** | (hij,n,rêz) Heştem. |
| **Heştê** | (hij,nl) Hejmara 80. 8×10= 80. |
| **Heşhizar** | (hij,n.l) Hijmara 8000. |
| **Heştir** | (n.x.dz) ***candar*** Hêştir. Deve. |
| **Heştmilyon** | (hij,n.l) Hijmara 8000000, |
| **Heştsed** | (hij,n.l) Hijmara 800. |
| **Heta** | (pêrb.pêvgir) ***rêzman*** Tixûbdana dem û dûrî. :Ji evro heta sube di vê te bi bînim. Ji mala me heta mizgeftê deh gavin. Heta kengî dê li benda te mînim?. ***Pend*** : Heta mirinê, kirine. ***Pend*** :Heta liser serî bi rêve neçî, bihayê pêyan nizanî. Pend :Heta di bêjim û di bêjimeve, dê çim û dê hêmeve.***Pend*** :Heta bûk xemilî govend vemirî. ***Pend*** :Heta mar rast nebit na çite di kunê ve.***Pend*** :Heta ne kevî destê dujmin, bihayê mirovê xwe nizanî.***Pend*** :Heta stûr zirav di bit, zirav di piçit.Ta. Tanî. |
| **Hetako** | (pêrb.dar) ***rêzman*** Tanî. Heta. :Hetako ez hatim tu li wê derê nemabûy. |
| **Hetav** | (n.x.mê) Ronahîya rojê. Tav. : Ew liber hetavê gêj di bit. : Hetava havînê dijware. |
| **Hetik** | (n.x.mê) şerim. şermizarî. Kirêtî.Fehêtî. Namûs. |
| **Hetikandin** | (k.jn.dar.mê) Pîskirin.Kirêtkirin. Fehêtkirin.şermizarkirin. (K) bdn :ez di hetikînim em di hetikînîn, tu dihetikînî hûn di hetikînin, ew di hetikîne[…it] ewan di hetikînin. Pr : dêbi +bdn. Bdb : di hetikand, di hetikandin. Db,dûr: hetikandibû, hetikandibûn. (F): bi hetikîne, bi hetikînin. |
| **Hetikbirin** | (k.jn.l.mê) şermizarkirin. Kirêtkirin.Bêrûmetkirin. şikandin. Ez dê htika wî bi bim. :Camêr dê bese te hetika me bir?. |
| **Hev** | (pêrb) ***rêzman*** Pêşpirteke di hevekanda bo girêdana wan. Êk. Pêkve. Bi hevra, hevdeng, hevbîr, htd. |
| **Heval** | (n.dar.dz) Birader. Dost. Hevrê. Hevkar.: ***pend*** Heger hevalê te şekir bit, hemîyê ne xwe.: ***pend*** Hevalê babê di bit hevalê kurî.: ***pend*** :Hevalê qelê nikil bi gûye,ang; hevalînî ya mirovê ne çakherdem poşmanî ye. ***pend*** : Heval yê dilî ye, bira yê leşî ye. |
| **Hevalbend** | (n.dar.dz) Hevalînî ya bi hevra. Desteya hevalan. |
| **Hevalbendî** | (n.dar.mê) Avakirina enî, bere, di nav bera kesan yan desteyan da jibo alîkarîya hev bi kin di kar û xebatê da. Qulp. Peyman. |
| **Hevalcêmk** | (n.l.mê) Cêmik. ;Ew û xweha xwe hevalcêmkin. |
| **Hevalînî** | (n.dar.mê) Dostînî. Biraderînî. |

| | |
|---|---|
| **Hevalînîkirin** | (k.jn.l.mê) Bûn hevalên hev. :Hevalînîya kesê xirab ne ke!.Ez hevalînîya wî na kim. |
| **Hevalkar** | (kn.dar.dz) Hevalên karî. Hevkar. :Ez û wî hevalkarin. |
| **Hevalkiras** | (n.l.mê) Derpê di gel kirasî, xasime yê jinan. Serdeling. |
| **Hevalnav** | (n.l.mê) ***rêzman*** Peyveke yan navekê ko pesindare; mîna hevalnavê xurî :ciwan, zana jîr, hejar. Hevalnavê darijtî mîna: rengîn guhdar. Nêrevan. Karker. Havalnavê lêkdayî mîna: mejîhişk, sermezin Bejinbilin û htd. Rengdêr. |
| **Hevaltî** | (n.dar.mê) Hevalînî. |
| **Hevbawer** | (hn.dar.çewa) Hevbîr. : Ew û birayê min hevbawein. |
| **Hevbend** | (n.dar. dz) Heval. Hogir.Hevalbend. |
| **Hevbendî** | . (n.dar.mê) Hevalînî. Têkilî. |
| **Hevbendîkirin** | . (k.jn.gl.mê) Têkilîkirin. Peywedîkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Hevbîr** | (hn.dar.çewa) Mirovên heman bîr û boçûn hebin. Xwedî yek armanc. |
| **Hevbîrî** | (n.dar.mê) Yek armancî.Hemanbîrî. |
| **Hevcar** | (n.dar.nêr) Hincar. |
| **Hevçerx** | (hn.dar.çewa) Mirovê xwe digel pêşveçûna dem diguhêre. Serdem. |
| **Hevdeh** | (hij,n.çend) Hejmara 17, hevdehhizar, hevdehmilyon. |
| **Hevdehem** | (hij,n) Ya/yê/ yên hevdê. |
| **Hevdehemîn** | (hij,n) Hevdehem. |
| **Hevdem** | (hn.dar.çewan) 1. Hevçerx. Digel demî xwe digihorit.2. Navê keç û kurane. |
| **Hevdu** | (pêrb) ***rêzman*** Êkûdu. Hev. |
| **Hevdîtin** | (k.jn.l.mê) Hevdu dîtin. êkdu dîtin. Çavpêkevtin. : Kurdistan TV hevdîtinek jibo çend qutabîyan rêkxist. |
| **Hevek** | (n.x.mê) ***rêzman*** Riste. Rêz. Rêzik. |
| **Hevêz** | (n.x.mê) Rikeha balindeyan. |
| **Hevgehandin** | (k.jn.l.mê) Hevgihandin. |
| **Hevgihandin** | (k.jn.l.mê) Vecivandin. Xirvekirin. |
| **Hevgur** | (n.dar.dz) Heval. Hogir. |
| **Hevhatin** | (k.jn.dar.mê) Pêkhatin. Peyman girêdan. (K) bn :Hatin. |
| **Hevirandin** | (k.jn.dar.mê) Gogirandin. Birîn. Kezaxtin. : Pora wî hevirand, tayên darê di hevirînin. |
| **Hevîr** | (n.x.nêr) Ar û av ên têkelkirî û hatîn vestirîn, nerim bûyî, jibo çêkirina nanî.***Pend*** :didanên hevîrî.ang ; didanên lewaz û sist. Hevîrê didanan.ang ; hevîrê şûştina didanan. |
| **Hevîrdidan** | (n.l.mê) Hevîrekê nemazeye di kin serfirçeyî jibo şûştina didanan bi kar di hînin, gelek cor tam hene. |
| **Hevîrkirin** | (k.jn.l.mê) Çêkirin û berhevkirina hevîrî. :Daykê got keça xwe rabe hevî bi ke dê mêvan hên.(K) bn : Kirin. |
| **Hevîrtirş** | (n.l.nêr) Madeyek nemazeye, di kin nav hevîrî dako tirş bi bit û bi kêr patinê bi hêt. |

| | |
|---|---|
| **Hevjîn** | (n.dar.dz) 1. Mirovên bi hevre dijîn. Heval. 2. Mêr yan jin. : Seyran hevjîna Memoye û Memo hevjînê Seyranê ye. |
| **Hevkar** | (n.dar.dz) Hevalkar. Heval. Alîkar. :Araz hevkarê min e. |
| **Hevkarî** | (n.dar.mê) Hevalînî di karî da.Alîkarî di karî da. |
| **Hevkarîkirin** | (k.jn.gl.mê) Alîkarîkirin. Bi hevre karkirin. :Hevkarîya min bi bi ke. :Supas jibo hevkarîya we digel me da kirî.(K) bn :Kirin. |
| **hevketin** | (k.jn.l.mê) Li hevkevtin. Lêkkevtin. Pevçûn. |
| **Hevkevtin** | (k.jn.dar.mê) Hevketin. |
| **hevkirin** | (k.jn.l.mê) Li hevkirin. Pêkkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Hevling** | (n.dar.nêr) Zelamên jinkên wan xuşkên hev.: Azad û hêja hevlingin, ango jinên wan xuşkên hevdu ne. |
| **Hevnav** | (hn.dar.çewa) Yên navên wan mîna hevdu bin. :Ez û te hevnavin. |
| **Hevojtin** | (k.jn.x.mê) bn:Hevotin. |
| **Hevok** | (n.x.mê) ***rêzman***.Hevek. Riste. :Ji peyva welat hevokekê dirist bi ke!. |
| **Hevoksazî** | (n.l.mê) ***rêzman*** Zanîna diristkirin û darijtna hevokan. |
| **Hevor** | (n.x.nêr) ***candar*** Ga. |
| **Hevotin** | (k.jn.x.mê) Perwerdekirin. Wanedan. Hînkirin. Fêrkirin. : Mamosta xwendekaran di hevoje. (K) : Ez di hevojim, bi hevoje, dê bi hevojin,… |
| **Hevpar** | (hn.dar.çewa) Hevpişk. Hevkar. |
| **Hevpeyivîn** | (jn.l.mê) 1. Dîdar. 2 Digel êk axivtin. Bi hevra peyvîn. :Radyoyê hevpeyvînek di gel min da kir. |
| **Hevqas** | (pêrb.alv, çend) ***rêzman*** Jibo çendayîyê bikar dihêt. : Hevqas tu li virî û min tu ne dî. : **Hevqas** pere,. Hinde. Temet. |
| **Hevra** | (hn.dar.çewa) Bi hevre.Pêkve. :Em dê bi hevra herin seyranê. |
| **Hevran** | (n.x.nêr) Dan ; genim, ceh di gûnîyan. :Mişkî hevran hingaftin. |
| **Hevraz** | (n.x.nêr) Evraz. |
| **Hevre** | (hn.dar.çewa) Bi hevre.Pêkve. Bihevre.Tebayî.:Ew bi hevre rûniştin. |
| **Hevrê** | (n.dar.dz) Kesê bi mirovî ra di rêyekê, cihekî, qonaxekê.Hevalê rê. Heval. |
| **Hevring** | (n.x.mê) Cewa birîna mûyê pora mirvan û bizinan yan hirîya pezan. Cew. Cewbir. |
| **Hevrist** | (n.x.mê) Dareka bê bere, herdem ya keske, belgên wê mîna stirîyane. Qaç. : ***Pend*** Hevrist ne dare, nêrgiz ne bihare, keç ne şûnware. |
| **Hevrî** | (hn.dar.çewa) Wekhev. Hevcor. |
| **Hevrîşim** | (n.x.mê) Avirmîş. |
| **Hevsar** | (n.dar.nêr) 1.Hefsar. Cilew. :Hevsarê kerî yê bi ser ve. 2 Hevsî. Cîran. |
| **Hevsê** | (n.dar.dz) Cîran. Cînar. Hevsî. |
| **Hevsî** | (n.dar.dz) Hevsê. |
| **Hevşî** | (n.x.nêr) Ciheke li çûlî, xwedî terş, pez û bizinên xwe lê bi şev lê di hêlin(mexel di kin). |
| **Hevzik** | (hn.dar.çewa, n.dar.nêr) Cêmik. |
| **Hew** 1 | (n.x.mê) Pêrabûn. : Hewa lêdana derzîkan li zarokan sube dê dest pê bi ket. |
| **Hew** 2 | (n.x.nêr) Derd. Kul. |

| | |
|---|---|
| **Hewandin** | (k.jn.x.mê) Mêhvan li malê wergirtin jibo xwarin, vexwarin û nivistinê. . Pêrgînîkirin. (K): Bdn: ez di hewînim em di hewînîn, tu di hewînî hûn dihewînin, ew di hewîne[…it ]ewan di hewînin. Bdb: di hewand, di hewandin. Pr: dê[bi] hewînim hewînîn, hewînî hewînin, hewînit[ne]. Db,dûr: hewandibû, …bûn. .(F): bi hewîne bi hewînin |
| **Hewcar** | (n.x.nêr) Hincar. |
| **Hewdan** | (k.jn.l.mê) Vekolîn. Kulbûn. Êvitîn. : Birîna wî baş ne hatibû dermankirin, lewra hew daye.(K) bn: Dan. |
| **Hewêl** | (hn.x.çewa) Vîr. Çavtirîwar. |
| **Hewês** | (hn.x.çewa,n.mê) 1. Panka destî. 2. Mirovê porweyayî, serweryayî.Keçel. |
| **Hewî** | (n.x.mê) Jina biser jinê hatî. Jinên yek mêrî di bin hewîyên hev.***Pend*** : Hewî hate nav derê, axîn keft jina berê.***Pend*** :Hewîyê jiber hewîyê xwe ciwan kir, jintîyê jiber jintîyê mal kir. |
| **Hewîdar** | (hn.dar.çewa) Xudan hewî. Bi ser hewî. |
| **Hewîdarî** | (n.dar.mê) Jiyan di gel hewîyan. |
| **Hewş** | (n.x.mê) Meydana ber derîyan, ko li bihar û havînan lê di rûnin. Asîtan. Derîzan. |
| **Hewyan** | (k.jn.x.mê) 1. Rawestan bêdeng. Rihetbûn .:Ev zaronahewit nizanim wî çi divêt.. 2. Wergirtin. Pêşwazîkirin. Pejirandin. Hecimtin[hecimîn].(K): bdn ez di hewtyim em di hewyîn, tu di hewyî[hewî] hûn di hewyin, ew di hewyit ewan di hewyin. Pr : dê[bi] hewim(hewyim) hewyîn(hewîn), hewyî(hewî)hewyin(hewin) hewyit(hewit). bdb: di hewya(hewî) di hewyan (hewîn). . (F): bi hewye [hewe] bi hewyin [hewin] |
| **Hey** | (pêrb) ***rêzman*** Alveke jibo hicmetîbûn û hoşdarîyê bi kar di hêt. |
| **Heya** | (pêrb) bn: Heta. |
| **Heyam** | (hk,dem. x.mê) 1. Demek kurt yan vebirî. : Eve heyameke tu ne dîyarî(xuyayî). 2. Navê jinane. Heyam keça Berojî ye. |
| **Heyho** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo peşêmanîyê bi kar di hêt. :Heyho mamo tujî ya xwe bêje. |
| **Heyî** | (hn.x.çewa) Mirov xudan mal û pare. Zengîn. : ***pend*** Heyî be, kurê kerî be, ;ang mal û pere li cel xelikî giringe, ne rûmet. |
| **Heyîn** | (k.jn.x.mê) Hebûn. |
| **Heyv** | (n.x.mê) 1.Stêra mezin li esmanan reng sipî, şêweyê xir[girover] yan şalokî di wergirit. ***Pend*** :Heyva xwe rûniştî dît !. Di bêjin bêvankesî heyva ji pêrve(piyanve) dît.:Jibo mirovê bi bext di hêt gotin.ang ; mirovê şensdar. ***Pend*** :Heyva bin ewrî,ang ; mirovê berze, ne diyar. 2. Meh. 3. Navê jinan û mêrane. |
| **Hez** | (n.x.mê) Tiştê dilê mirov pê xweş be.Vîyan. : Heza te çiye ?. Heza min xwendina rojnameyane. |
| **Hezar** | (hij,n) Hijmara 1000. Hizar. |
| **Hezaran** | (hij,n) Gelek hezar. Çend hezar. Bi hezaran. |
| **Hezkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov hez ji tiştek yan kesek bi ke. Ez hez ji te di kim. (K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Hê** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê hicmetîbûnê ye. : Hê; Ew tu li wêrê[wê derê] çi di kî! |
| **Hêbetî** | (hn.dar.çewa) Hicmetî. Seyr. |
| **Hêbetîbûn** | (k.jmê) Dem mirov tişek seyr bi bînit û bawer nekit , hêbetî dibit .hicmetîbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Hêcet** | (n.x.mê) Dema mirov nexwazit karekî bi ket dê jibo xwe li hindek behanan gerit dako hemberê xwe razî ket. Behane.:Heger tu naxwazî biçî kar, hema neçe, bes li hêcetan negere.: *pend* :Bi hêceta silkê xwe gehand kutilkê ;ango dema merem ji gotin yan kiyara mirov ne ew bi xwe be lê tiştek mezintir be. |
| **Hêdî** | (hn.çewa) 1. Kiryareka mirov li ser xwe û bi dilê xwe bi ke , lez nekit. . 2. Navê mêrane. Brx Lezgîn. |
| **Hêdîhêhî** | (hn.dar.çewa) Gelek hêdî. Hêdî. |
| **Hêdîka** | (hn.dar.çewa) Hêdî. Pêdizkî. : Ez hêdîka derkevtim da zaro ji xew ne rabin. |
| **Hêdîkirin** | (k.jn.l.mê) Sistkirin. Leza wî/wê/wan kêmkirin. Kêmkirin. : Leza tirombêlê hêdî ke. : Dengê televisyûnê hêdî ke. |
| **Hêj** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo karê ne bûye bi kar di hêt..Ta noke. Ta vêgavê. Heşta. : Eve hêj tu li malî ?. |
| **Hêja** | (hn.x.çewa) 1.Birûmet. Birêz. Rêzdar. Tu mirovekê hêjayî. 2. Navê jin yan mêrane. |
| **Hêjandin** | (k.jn.x.mê) Nirxandin. Bilindragirin. Helsengandin. |
| **Hêjîr** | (n.x.mê) ***fêqî*** Hijîr. |
| **Hêjmar** | (n.x.mê) Hijamar. |
| **Hêjmartin** | (k.jn.x.mê) Hijmarin. Hijmartin. |
| **Hêk** | (n.x.mê) Tuxmê giyandarane, ji kevilek req û xir yan hekî [lûle]pêkhatîye di navda şileyek tîr heye du pişkin spîlk û zerik.Hêkên mirîşk, çûçik, qaz, û htd. : ***Pend*** :Hêka dîkilî ;ang jibo tiştê êkcarî kêm yan qetlazî dibêjin. ***Pend*** :Hêka evro çêtire ji mirîşka sube. ***Pend*** :Hêk her hêke û tameke, çi sor,zer yan keske.***Pend*** :Hêka dilmê ye. Ang ; mirovê gelek xwe nazik di ke. |
| **Hêkanê** | (n.dar.mê) ***yarî*** Lîstikeka kevina kurdewarîye , çend kes di rûnin û serê hêkan lêk diden, yê ko hêka hemberê xwe bi!kênit ya sersax bi mînit, dê serkevit û herdu hêk bo wî di mînin. |
| **Hêkerûn** | (n.l.mê) Xwarineke ji hêk û rûnî dirist di kin, bi hevra di qelînin. |
| **Hêkeyî** | (hn.dar.çewa) ***endaze*** şêweyê mîna hêkê lûleyî.şêweyê erdî hêkeyî ye. |
| **Hêkî** | (hn.dar.çewa) ***endaze*** bn :Hêkeyî. |
| **Hêkker** | (hk.dar.çewa) Giyandarên hêkan di ken. : Mirîşka hêkker. |
| **Hêkkirin** | (k.jn.l.mê) Dema giyandar, nemaze balinde, hêkan dikin. :Çûçikê hêkek kir. |
| **Hêl** 1 | (n.x.mê) Xîça bi qelemî yan her tiştek din kêşayî. Gîx. Xîç. |
| **Hêl** 2 | (n.biyan .x) Corek biharatane di kin nav ça yan xwarinê jibo tama wê xweş bi be. |
| **Hêl** 3 | (cugirn.x.mê) Al. Rex. :Sêmêl li hêla Duhokê ye. |
| **Hêlan** | (k.jn.x..mê) 1. Tişekî li cîyekî danî û ne bizivînî. : Min kitêba a xwe li cem wî hêla . 2. Karekî kuta bi kî. Dest jê berdan. :Birayê min cigare hêlan. 3. |

| | |
|---|---|
| | Destûrdan. Rêdan. 4.Navê jinane. (K): Bdn: ez di hêlim em dihêlîn, tu dihêlî hûn dihêlin, ew dihêle[..it] ewan dihêlin. Pr: dê bi + bdn. Bdb: di hêla dihêlan. Db,dûr: hêlabû,..bûn.(F): bi hêle bi hêlin. |
| **Hêlane** | (n.x.mê) Hêlîn. |
| **Hêlanek** | (n.dar.mê) Colandik. Hêzik. |
| **Hêlik** 1 | (n.x.n) ***leş***Endamekê cot yê guhnelîya candarên nêre. Gun. |
| **Hêlik** 2 | (n.x.mê) Hêk. |
| **Hêlîn** | (n.x.mê) 1. Mala teyr û tewal bi pî! û pelexî çêdikin û hêkên xwe di daninê. 2. Navê jinane. |
| **Hêlkan** | (n.x.mê) Hêlanek. Colandik. |
| **Hêlke** | (n.x) Hêk. |
| **Hêma** | (h.x.mê) Çember. Sîmbol. Nîşan. |
| **Hêmin** | (hn.x.çewa) 1. Hêdî. Aram. 2. Navê mêrane. |
| **Hênan** | (k.jn.x.mê) Anîn. Înan. Hînan. |
| **Hêncet** | (n.x.mê) Hêcet. |
| **Hênik** | (hn.x.çewa) Hûnik. Fênik. |
| **Hênikbûn** | (k.jn.l.mê) Hûnikbûn. |
| **Hênikkirin** | (k.jn.l.mê) Hûnikkirin. |
| **Hêr** | (hn.x.çewa) Mirovê hay ji xwe nebit. Difinbilind. |
| **Hêran** | (k.jn.x.mê) Hûrkirina danî, xwarinê. :Genim bi distarî hêra. Bi aşî hêra.(K) bdn :ez di hêrim em dihêrîn, tu dihêrî hûn dihêrin, ew dihêre[..it] ewan dihêrin. Pr : dê bi + bdn. Bdb : di hêra , di hêran. Db,dûr : Hêrabû,… bûn. (F): bi hêre bi hêrin. |
| **Hêrandin** | (k.jn.dar.mê) Dan hêran. Hatin hêran. Hûrkirin. |
| **Hêrifandin** | (k.jn.dar.mê) Herifandin. |
| **Hêrifîn** | (k.jn.x.mê) Herifîn. |
| **Hêris** | (hn.x.çewa) Tore. Enirî. Xeyîdî. :Seydayê me îro gelek ê hêrise. |
| **Hêrisbûn** | (k.jn.l.mê) Torebûn.Enirîn. :Ez nizanim wî çiye, gelekê hêris bûy!. :Tu bi xubê hêris nebe. (K) bn : Bûn. |
| **Hêriskirin** | (k.jn.l.mê) Torekirin. Enirandin.:Te ez hêris kirin. :Min tu hêris kirî. (K) bn:Kirin. |
| **Hêrisok** | (hn.dar.çewa) Silsilok. Tore. Navçavgirê.: Tu çendê hêrisokî, min nikare henekan bi te ra bi ke!. |
| **Hêriş** | (n.x.mê) Êrîş.:Hêrişa pêşmergehî bo ser çeperên dijminî li spêdê dest pê kir.:Hêrişeka berfireh. |
| **Hêrişanîn** | (k.jn.l.mê) Êrişbirin. :Dujminî hêrişek mezin anî ser devera rizgarkirî. |
| **Hêrişbirin** | (k.jn.l.mê) Êrişbirin. |
| **Hêrişkirin** | (k.jn.l.mê) Êrişkirin. |
| **Hêrîn** | (k.jn.x.mê) Hêran. |
| **Hêro** | (n.x.mê) 1. ***gul*** Guleka ciwane reng spî, sor,pîvazî htd, li çiyên Kurdistanê hişîn di be.2. Navê jinane. |
| **Hêsan** | (hn.x.çewa) Sanahî. Xurî. Sivik. Brx Çetin. |
| **Hêsanbûn** | (k.jn.l.mê) Sanahîbûn. :Hatinûçûn roj bo rojê hêsan tir di be.(K) bn : Bûn. |

| | |
|---|---|
| **Hêsandin** | (k.jn.dar.mê) Sanahîkirin. |
| **Hêsanî** | (hn.dar.çewa) Sanahî. Sanayî. |
| **Hêsankirin** | (k.jn.l.mê) Sanahîkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Hêsil** | (n.x.mê) Curnekê taybetîye ji; ber, kils yan darî hatîye diristkirin, jibo çêkirina doşavê. ûsle. |
| **Hêsîr** | (hn,n.x.çewa.dz) Dîl. Bend. Êxsîr. |
| **Hêsk** | (n.x.mê) ***yarî*** Lîstikek dilvekere, werîsek bi darekê ve hilawîstî , herdu serên wî li xarê girê di din û mirov têda di rûnit û xwe di hijînit. Hêzok. |
| **Hêstir** 1 | (n.x.mê) Dilopên(çipik) avê yên ji çavan di barin. Rondik.:Hêstirên çavên wê mîna tevîya baranê di barîn. |
| **Hêstir** 2 | (n.x.dz) ***dewar*** Giyandarek malî ye tuxmê ji ker û mahînane yan hesp û makeran. ***Pend*** :Suxra hêstiran rûvîyan bazdan. |
| **Hêşta** | (pêrb.dem) ***rêzman*** Hêj.Hêjta. Hêşta babê min yê li xestexanê. :Hêşta wî jin ne anî ye!. |
| **Hêştir** | (n.x.dz) ***candar*** Deve. |
| **Hêşû** | (n.x.nêr) Îşîyê tirî. |
| **Hêt** | (n.x.nêr) ***leş***Hestîyê ranî. Ran. |
| **Hêtê** | (n,gazkirin.dar.mê) ***rêzman*** Jina leng. Jina li dema rêveçûnê di lenge. |
| **Hêto** | (n,gazkirin.dar.nêr) Mêrê leng. |
| **Hêtûn** | (n.x.mê) Komir. Êtûn. |
| **Hêvên** | (n.x.nêr) 1.Nivişe her tiştekî yê ko ji wî peyda di bin. 2.Hêvênê, mastî, penîrî ,htd jibo mehandinê bi kar di hêt. |
| **Hêvî** | (n.x.mê) Hîvî. |
| **Hêvîdar** | (hn.dar.çewa) Daxwazker. Hîvîdar. |
| **Hêvîkirin** | (k.jn.l.mê) Hîvîkirin. Daxwazkirin. (K) bn :Kirin. |
| **Hêvkirin** | (k.jn.dar.mê) Berêxwedan. Temaşekirin.Nêrîn. Mêzekirin. Meyzandin. (K) bn: Kirin. |
| **Hêwer** | (n.x.nêr) Birayê mêrî[jibo jinê]. Tî. |
| **Hêwirandin** | (k.jn.dar.mê) Xwecihkirin. (K) bdn: ez di hêwirînimem di hêwirînîn, tu di hêwirînî hûn di hêwirînin, ew di hêwirîne[..it] ewan di hêwirînin. Pr: dê bi+bdn. Bdb :di hêwirand, di hêwirandin. Db,dûr: hêwirandibû,… bûn. (F): bi hêwirîne, bi hêwirînin. |
| **Hêwirîn** | (k.jn.x.mê) Xwecihbûn. Hewyan. (K) bdn: ez di hêwirimem di hêwirîn , tu di hêwirî hûn di hêwirin, ew di hêwire[…it] ewan di hêwirin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : ez di hêwirîm, em, hûn, ewan di hêwîrîn.tu,ew di hêwirî. Db,dûr : ez hêwirîbûm,em hêwirîbûyn, tu hêwirîbûy, hûn,ewan hêwirîbûn, ew hêwirîbû. (F): bi hêwire bi hêwirin. |
| **Hêz** | (n.x.mê) 1.şiyana fîzîkî(leşî) . :Hêza xwe lê taqî kir. :Kareke ji hêza min mezintire. Karîn. Tundî. 2.Yekeyeka leşkerîye ji çend pêşmergeyan pêkhatîye. |
| **Hêzan** | ( hn.dar.çewa) Mirovê,candarê bi hêz. :Azad xortekê hêzane. |
| **Hêzdar** | (hn.dar.çewa) Hêzan. Bi hêz. |
| **Hêzok** 1 | (hn.dar.çewa) Tiştê di hejit. Livok. Leqok. |

| | |
|---|---|
| **Hêzok** 2 | (n.dar.mê) Hêsk. |
| **HHK** | (kurt) Hukometa Herêma Kurdistanê. |
| **Hicmetî** | (hn.x.çewa) Seyr. Semere. Hêbetî. :Wey dayê çi xortekê hicmetîye ?. |
| **Hicmetîbûn** | (k.jn.l.mê) Hêbetîbûn. Seyrman. :Te çiye tu hosa hicmetî bûy ?.(K) bn : Bûn. |
| **Hicmetîkirin** | (k.jn.l.mê) Hêbetîkirin. (K) bn : Kirin. |
| **Hiçhar** | (n.dar.mê) Bîbera sor ya har. Bîbera tîj. |
| **Hiçik** | (n.x.nêr) Cihê destên mirovî têra derdikevin ji kirasan. Kirasê hiçikkurt , hiçikdirêj. Çîlan. |
| **Higvîn** | (n.dar.nêr) Xwarinek pir şirîne di nav şanan da mêşhingvîn çêdiket.Hingiv. Hingvîn. |
| **Hijandin** | (k.jn.x.mê) Tiştê mîna hêskê di bizivit. Hejandin.Leqandin. Livandin. : Landik hijandin. Dest hijandin. (K) bdn: ez di hijînim em di hijînîn, tu di hijînî hûn dihijînin, ew di hijîne[…it] ewan di hijînin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : diheijand, di heijandin. Db,dûr: hijandibû,.. bûn. (F): bi hijîne bihijînin. |
| **Hijdeh** | (hijn.çend) Hejdeh. |
| **Hijîr** | (n.x.mê) ***fêqî*** 1. Dareka belg pane, berdare.2. Fêqîyek xweş û şirîne gelek cor û reng hene. ***Pend*** :Hat dema tefsik û hijîran, malêd me xwe!tirin ji yêd mîran. |
| **Hijmar** | (n.x.mê) Hejmar. 1,2,3,70, htd. |
| **Hijmartin** | (k.jn.mê) Zanîna çendîyê. Rêzkirina hijmaran. (K) bdn: ez di hijmêrim em di hijmêrîn, tu di hijmêrî hûn di hijmêrin, ew di hijmêre[…it] ewan di hijmêrin. Pr:dê[bi]+ bdn. Bdb: dihijmart, di hijmartin. Db,dûr: hijmartibû,.. bûn. (F): bi hijmêre bi hijmêrin. |
| **Hikmet** | (n.x.mê) Deshelat. Hukomet. Civata wezîran. |
| **Hilanîn** | (k.jn.dar.mê) 1.Bilindkirin. Rakirin. Rahijtin. 2. Tolhilanîn; tolevekirin.(K) bdn: ez di hilînim, em di hilînin, (F): bi hilîne. |
| **Hilavêtin** | (k.jn.dar.mê)1.Derkevtina xwarinê ji gedey di rêya devî da ji egera pîsbûna zadî yan nesaxîyê. Hilandin. Dilrabûn. 2.Tiştekî bilind bihavêjî. :Zarokê xwe ji keyfan di hilavêt. Ang; xwe bilind di kir. Di hilavên, bi hilavêje,…. . |
| **Hilawîstin** | (k.jn.x.mê) Wekî mirov tiştekî bi tayekî ve girê de û bi darek yan cihek bilind ve bi girde. Daleqandin. :Xwe bi darê ve hilawîst. (K) bdn: ez di hilawîsim em di hilawîsîn, tu di hilawîsîhûn di hilsawîsin, ew di hilawîse[..it] ewan di hilawîsin.Pr:dê bi+bdn. Bdb: di hilawîst, di hilawîstin. Db.dûr: hilawîstibû, ….Bûn. (F): bi hilawîse, bi hilawîsin. |
| **Hilber** | (n.x.mê) Ber. Berhem. |
| **Hilberandin** | (k.jn.dar.mê) Berhemanîn. Geşkirina aborî. |
| **Hilbijartin** | (k.jn.dar.mê) Jêgirtin. Ji nav girtin. Bijartin. :Kesekî hilbijêrin jibo nûnerî ya mirovî di dezgehekî da bi ke. (K) bn: Bijartin. |
| **Hilbijêr** | (hk.dar.çewa) Mirovê mafê dengdan û hilbijartinê hebe. Yê dengê xwe di de berbijarekî. BRx Berbijar. Berbijêr. |

| | |
|---|---|
| **Hilbûn** | (k.jn.dar.mê) 1. Agir berdane ti!tekî. Agir hilbû. Pêkevtin. 2. Bi ser kevtin. Serevrazbûn. :Ew hilbû çiyayî. |
| **Hilciniqandin** | (k.jn.dar.mê) Ciniqandin. |
| **Hilciniqîn** | (k.jn.dar.mê) Ciniqîn. |
| **Hilçinîn** | (k.jn.dar.mê) Dema bendik yan dezî têk di alizin. Alizîn. :Kasêt hiçinî. Xirvebûna davê liser êk. |
| **Hilço** | (n.x.nêr) Darikê hilawîtina cilikan. Cildank. |
| **Hildan** | (k.jn.dar.mê) 1.Bilindkirina her ti!t jibo serî. Hilgirtin.,serhildan. delinghidan.2. Kezaxtin. :Dara berî, mazî hilda.(K): ez hildidim em hildidîn, tu hildidî hûn hildidin, ew hildide ewan hildidin. (F): (bi) hilde hildin. |
| **Hilêvirîn** | (k.jn.dar.mê) Tiştê dapoşî hilêvirîn,ang; der, dergeh, dervank, û htd liser rakirin. :Qazan ya hilêvirî. (K) bdn : ez dihilêvirim em di hilêvirîn, tu di hilêvirî hûn di hilêvirin, ew di hilêvire[...it] ewan di hilêvirin. Pr: dê [bi] +bdn. Bdb: di hilêvirî, di hilêvirîn.Db,dûr: hilêvirîbû, hilêvirîbûn[bi]. (F): bi hilêvire, bihilêvirin. BrxNixavtin. |
| **Hilêvirî** | (hk,rd.dar.çewa) Amanê bê serpo!k. Dervank liser rakirî. Ev xwarine ya hilêvirî ye. BRx Peçinî. |
| **Hilgavtin** | (k.jn.dar.mê) Hilgirtin. Rakirin. (K) hilgavêje, dihilgavêjin. |
| **Hilgirtin** | (k.jn.dar.mê) 1. Tiştekî bi dest rakey. Rakirin. 2. Danana tiştî jibo heyamekê. : Me berka nav malê ya hilgirtî tanî zivistanê.Veşarin, ve!artin. (K): Ez hildigirim em hildigirîn, tu hildigirî hûn hildigirin, ew hildigirit ewan hildigirin. (F): bi hilgire bi hilgirin.(K) bn :Girtin. |
| **Hilingivîn** | (k.jn.x.mê) Dema bi rêveçûnê berek yan her tiştek bikevit ber pêyan, mirov bi kevit yan bi setimit. Setimîn. (K) bdn: ez di hilingivtim em di hilingivtîn, tu di hilingivî hûn di hilingivtin, ew hilingive[...it] ewan di hilingivtin. Pr:dê bi + bdn. Bdb: di hilingivtim, di hilingivtîn, di hilingivtî, di hilingivtin. Db,dûr: Hilingivtibûm,.bûyn, bûy, bû.. bûn. (F): bi hilingive bi hilingivin. |
| **Hilkehilk** | (n.dar.mê) Dengê hatinûçûna bêhina mirovî dema westanê. Bêhin bi ser kevtin. |
| **Hilkehilkkirin** | (k.jn.gl.mê) Mirov hilkehilkê di ke. :…hinî mandî bûye, yê hilkehilkê di ke.(K) bn : Kirin. |
| **Hilkêşan** | (k.jn.dar.mê) Rakêşana tiştekî ji çalekê yan cihekê khûr bi hêza fîzîkî. Deranîn. Înan derê. : Dixtorî didanê wî hilkêşa. Dahêran. :Dûkela cigarê hilkêşa. :Setlê ji bîrê hilkêş.:Pîyêd xwe hilkêşe ber xwe. (K) bn: Kêşan. |
| **Hilkirin** | (k.jn.l.mê) 1.Pêkirin. Berdanê. Agir hilkirin. 2. Derînan. |
| **Hilkişandin** | (k.jn.dar.mê) Deranîn. Înan der. Qurtifandin. (K) bn: Kişandin. |
| **Hilkişîn** | (k.jn.dar.mê) Bilindbûn. Serevrazbûn. |
| **Hilm** | (n.x.mê) 1. Gaza bi av ya ji encamê kelîn yan gerimbûna avê radibit.2.Bayê gerim ê ji devê mirov derdikevit. |
| **Hilo** | (f) Rabe. Rabe ser xwe. |
| **Hilperiştin** | (k.jn.dar.mê) Hilbûne evrazî. Serkevtin. : Ew hilperişe kevirî. |
| **Hilşandin** | (k.jn.x.mê) bn :Heliş |

| | |
|---|---|
| | andin. |
| **Hilû** | (hn.x.çewa) Tiştê hilû;ango yê ne zivir, ko tişt liser di hilisin. Dîwarê hilû, Dergehê hilû, pora hilû,sabûna hilû. |
| **Hilûbûn** | (k.jn.l.mê) Dema tiştek hilû di be. : Paş rengkirinê dîwarê me yê hilû bûy. (K) bn: Bûn. |
| **Hilûkirin** | (k.jn.l.mê) Dema cilek bi hêt hilûkirin. : Didanên xwe bi firçekirinê hilû kirin. :Pora xwe hilû kir. (K) bn: kirin. |
| **Hilweryan** | (k.jn.dar.mê) 1.Tiştê bi kevit xwar. Weryan. Daqutan.:Dar hilweryaye,ango belgên wê hemû weryane.2. Lewazbûn.:Ev mirove yê hilweryayî. (K) bn :Weryan, weran. |
| **Hilweşan** | (k.jn.dar.mê) Jinavçûn. Neman (K) bn: We!an. |
| **Hilweşandin** | (k.jn.dar.mê) Biryarekê bi hiweşînit.Jinavbirin. Pûçkirin. . :Parlementa Kurdistanê piranîya biryarên ser dema rijêmê hilweşandin. (K) bn: Weşandin. |
| **Him** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê wekhevkirinê.Hem.Heman. |
| **Himban** | (n.x.mê) Pîstê kewalan di serda di hînin xar(di gurên) mûyê wî jê diken paş hişk di bit dibe kevil jibo tê kirina dan û pêdvîyên malê. ***Pend*** :Erzankiro himban diro.ang; yê pir mitayên erzan bi kire, dê himbana wî dirit û ziyan gehit malê, jiber hindê mitayê kêm û çak bit bila giran bit. |
| **Himber** | (n.dar.mê) beramber.:Mala me li himber ya wane. :Ez li himber wî rawestam. |
| **Himbêz** | (n.x.mê) Hembêz. |
| **Himbêzkirin** | (k.jn.l.mê) Hembêzkirin. |
| **Himbil** | (hn.x.çewa) Cilikên peritî, dirayî. Kinçir. |
| **Himhim** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengûdor. Dengê sofîyan li mizgefta. |
| **Hin** | (pêrb) ***rêzman*** Jibo kes yan tiştê nebinavkirî. :Hin dizanin û hin nizanin. : Hin bi mînin û hin werin. |
| **Hinar** | (n.x.mê) ***fêqî*** 1. Dareke bibere. 2. Core fêqîyeke xire dindikdare, gelek cor û tam hene. |
| **Hinare** | (n.dar.mê) şand. Hinartî |
| **Hinarik** | (n.dar.nêr) ***leş***Cot hestîyên di kevin bin herdu çavan li ser rûyên mirovî. |
| **Hinarin** | (k.jn.x.mê) şandin. Virêkirin. (K) bdn: ez di hinêrim em di hinêrîn, tu di hinêrî hûn dihinêrin, ew di hinêre[…it] ewan dihinêrin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : di hinart, di hinartin.(F): bi hinêre bi hinêrin |
| **Hinarî** 1 | (n.x.mê) Xirîk. |
| **Hinarî** 2 | (hn.dar.çewa) Core rengeke, ber bi sorekê geş ve ye, wek rengê hinaran. |
| **Hinartin** | (k.jn.x.mê) bn :Hinarin. |
| **Hinav** | (n.x.pir) ***leş***1.Valayîya navbra bergê giyadarî û endamên nav zik û singî. 2. Mêranî. :Ew mirovekê bi hinave; angomêrçake. |
| **Hinavreş** | (hn.l.çewa) Zikreş Dilreş. :Wey bira eve çi jineka hinavreşe!. |
| **Hinavsotî** | (hk.l.çewa) Dilsotî. Kovandar. |
| **Hinavşîn** | (hn.l.çewa) Zikreş. Hinavreş. |

| | |
|---|---|
| **Hincar** | (n.x.nêr) Alaveke cotyar jibo kêlana erdî bi kar di hînin.:Hincarê cotyarî bi erdî ra şikest. Hevcar. |
| **Hincinîn** | (k.jn.x.mê) Pirtikandin. Çirandin. :Canê wî bi guleyan hat hincinîn. (K) bdn: ez di hicinînim em di hincinînîn, tu di hincinînî hûn di hincinînin, ew di hincinîne[…it] ewan di hincinînin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : di hincinand, di hincinandin. Db,dûr : hincinnandibû,… bûn. (F) : bi hincinîne, bi hincinînin. |
| **Hincirandin** | (k.jn.dar.mê) Givaştin. Pestandin. |
| **Hinchinc** | (hk.dar.çewa) Parçeparçe. Pirtpirt. |
| **Hinchinckirin** | (k.jn.gl.mê) Hincinandin. |
| **Hind** 1 | (pêrb) ***rêzman*** Kes yan tiştê nebinavkirî. |
| **Hind** 2 | (hk.cih.cugr,n) Hindistan. |
| **Hinda** | (hn.x.çewa) Berze. Nexuya .Nediyar. :Ev çend salin lawê wî hinda ye. |
| **Hindabûn** | (k.jn.l.mê) Berzebûn.(K) bn: Bûn. : Pareyên wî li aqarî hinda bûn. |
| **Hindakirin** | (k.jn.l.mê) Berzekirin. (K) bn: Kirin.:Heta gore dî,pêlav hinda kir. |
| **Hindav** | (hk.cih) Li alîyê serî. : Ez hatim hindav serê wî li ser kevirî. : Gundê me di keve hindav çemî. |
| **Hindek** | (pêrb) ***rêzman*** Hind.***Pend*** :Hindek pê mirin, hindek bo mirin.***Pend*** :Hindekan wey bab û wey babe, hindekan bist û kebabe. |
| **Hindik** | (hn.dar.çewa) Piçek. Kêm. Pîçek.: Axivtina te hindike, lê rindike. |
| **Hindikahî** | (hn.dar.çewa) Kêmatî. Kêmayetî.: Kurd li Iraqê ne hindikahîye. |
| **Hindikbûn** | (k.jn.l.mê) Kêmbûn. Li kêmî dan. (K) bn: Bûn. |
| **Hindikkirin** | (k.jnl.mê) Kêmkirin. (K) bn: Kririn. |
| **Hindistan** | (hk.cih.curgir,n) Welatê hindîyan. |
| **Hindî** 1 | (netew,n) Xelikê Hindistanê. |
| **Hindî** 2 | (pêrb) ***rêzman*** 1.Alavê çendîyê ye. Herçend. Çend. :Hindî bêjî ew xortekê hêjaye. : ***pend*** Hindî bi mînîn dê bînîn. ***Pend*** :Hindî li benda tebim, dê her ev male bim. 2. Temet. Hevjî. : Xanîyê me hindî yê weye. :Ez û tu hindî êkîn. |
| **Hindur** | (hk.cih) Navxwe. Navxo. : Li hidurî welat. Brx Derve. |
| **Hinek** | (pêrb) Hindek. |
| **Hiner** | (n.x.nêr) Huner. |
| **Hinermend** | (kar,n.dar.dz) Pispor di warê hunerî da.Hunermend. |
| **Hingav** | (n.dar.mê) Pêngav. |
| **Hingavtin** | (k.jmê) Gurzek bi tiştekî bikevit û ziyan bi gehitê. Birîndarkirin. Lêdan. Lêxistin. :Firoke şikênan firokek hingaft. (K) bdn: ez di hingêvim em di hingêvîn, tu di hingêvî hûn dihingêvin, ew di hingêve[..it]ewan di hingêvin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : di hingaft, di hingaftin. Db,dûr : hingavtibû, … bûn. (F): bi hingêve bi hingêvin. |
| | |
| **Hingê** | (hk.dem) ***rêzman*** Wê serdemê. Dema berê.Hîngê. |
| **Hingijtin** | (k.jn.dar.mê) Mirov ji çavtarî xwe bi havêt tiştekî. Lêpalebûn. Hingijtine tiştî : Bezînê, xwe avêtinê.(K) bdn: ez di hingijim em di hingijîn, tu di hingijî hûn di hingijin, ew di hingije[…it] ewan di hingijin. Prdêbi +bdn. Bdb: ez di |

| | |
|---|---|
| | hingijîm em di hingijîn, tu di hingijî hûn di hingijîn, ew di hingijî ewan di hingijîn. Db,dûr: ez hingijîbûm em hingijîbûyn, tu hingijîbûy hûn hingijîbûn , ew hingijîbû ewan hingijîbûn(bi bûn). (F): bi hingije, bi hingijin. |
| **Hingil** | (n.x.nêr) ***candar*** 1.Zendik.Çingil.2. Kemax. Til. |
| **Hingiv** | (n.x.nêr) Hingivîn. :Hingivê zozan pir xwe!e. |
| **Hingivîn** 1 | (n.dar.nêr) Xwarina şirîn û bi tam ya mêşhingiv çê dike. Hingiv.2. Mirov yan tiştê mîna hingivînî rind û şirîn. |
| **Hingî** | (hk.dem) Hîngê. Hîngê. |
| **Hingilîsk** | (n.dar.mê) Gustîlk. |
| **Hinik** | (pêrb) ***rêzman*** Kes yan tiştê Nediyar. Hinek. |
| **Hir** | (n.x.nêr) Bayê bi hêz û toz. Hur. |
| **Hirç** | (n.x.dz) ***ginawir*** Candarek kûvîye,şîrdere, dirindeye, li daristan û çiyan dijît. ***Pend*** :Hirç candareka xirabe, çunko hêkan na ket.***Pend***:Hirça bi kudî ne berde dora gundî. ***Pend*** :Hirç û cot rûvî û gêre!. |
| **Hirên** | (n.x.mê) ***deng*** Dengê bayî.Dengê hirî. :Dengê hirêna baye, diyare dê baran bait?. |
| **Hirhir** | (n.dar.mê) ***deng*** 1. Dengê bayî. Hirên.2. Dengek nexasime şivan bi kar di hînin jibo hawîşkirina kewalên xwe. |
| **Hirî** | (n.x.mê) Mûyên pezî. :Hirîya mihan. :Hirîya baranan. : Sakoyê ji hirî yê pir getme. |
| **Hirmî** | (n.x.mê) Hirmîk. :Hirmî fêqîyekê bi tame. |
| **Hirmîk** | (nax.mê) ***fêqî*** 1.Dareka fêqîye. 2. Fêqîyeke berê dara hirmîkêye. |
| **Hisan** | (n.x.nêr) Berav.:Hisanê me yê berzeye, niza li kîrê ye. :Das bi hisanî xweş kir. |
| **Hisîk** | (n.x.mê) ***giya*** Hişînkatîyekê dême, tiraşa wê bi stirî ye, xemil keske berê wê xir yan dirêjoke, di keskin, zaro di beran di hisîn şûna wê sor di be. Dema hişik di be di hêrin û arê wê di gel şekirê têkel di ken û di xun. Xurnîfk. |
| **Hisîn** | (k.jn.x.mê) Tîjkirina devê das, kêr, sator, htd. Seqakirin.(K) bdn: ez di hisîm em di hisîn, tu di hisî hûn di hisin, ew di hise [..ît ] ewan di hisin. Pr:dê bi+ bdn. Bdb : di hisî, di hisîn. Db,dûr : hisîbû, …bûn. (F): bi hise bi hisin. |
| **Histewr** | (hn.x.çewa) Stewir. Xirş. |
| **Histukur** | (n.x.mê) ***candar*** Sto. Stukur. |
| **Hiş** 1 | (n.x.mê) Ageh. Hoş. |
| **Hiş** 2 | (ferm.hişbûn) Fermane jibo bêdengkirinê bi kar di hêt. |
| **Hişar** | (hk.cih..x.mê) Hişargeh. |
| **Hişargeh** | (hk.cih.dar.mê) Cîyê bi av û daristan jibo hewana , bêhinveda şivan, karwanî û pêşmergan. |
| **Hişavtin** | (k.jn.x.mê) Dahîran. Qurçandin. Bi hişêve, di hişêvin. |
| **Hiş** | (hk.x.çewa) Bêdeng. Mit. |
| **Hişbûn** | (k.jn.l.mê) Bêdengbûn. Mitbûn. Kuro hişbe, heger dê te derêxim !. (K) bn : Bûn. |

| | |
|---|---|
| **Hişk** | (hn.x.çewa) Zuha. Neter. Neşil. :Dara hişk. :Cilikêd hişk. :Berê hişk. : devê hişk. |
| **Hişkandin** | (k.jn.x.mê) Hişkkirin. |
| **Hişkatî** | (n.dar.mê) Dema nehatina baranan, erd zuha di be. : Jiber hişkatîya evsale, av kêm bûn û seqa gerim bû.. |
| **Hişkav** | (h.cih.l.çewa) Tişt yan cihê ji hişkî û avê pêkhatî. |
| **Hişkavî** | (hn.l.çewa) Giyandarên jîyana wan di avê û hişkayî da, wek beq. |
| **Hişkbûn** | (k.jn.l.mê) Zuhabûn. :Kanîya gundî evsale ya hişk bûy. (K) bn: Bûn. |
| **Hişkesalî** | (n.l.mê) Sala bê rêjî, ya berf û baran ne, yan kêm bi barit. |
| **Hişkirin** | (k.jn.l.mê) Bêdengkirin (K) bn : Kirin. |
| **Hişkî** | (hn.dar.çewa) Hişkatî. |
| **Hişkkirin** | (k.jn.l.mê) Zuhakirin. . Av jê birîn. Zuhakirin. (K) bn: Kirin. |
| **Hişsivik** | (hn.l.çewa) Bêmejî. Kamaqil. |
| **Hiştin** | (k.jn.x.mê) Hêlan. Bi cih hêlan. Jê geryan. :Min perên xwe li mal hiştin. :Rih hiştin. Ang ; rih berdan. |
| **Hişyar** | (hn.dar. çewa) 1. Kesê herdem çeleng bit. Ne nivistin. Haya wî hebit.2. Navê mêrane. |
| **Hişyarbûn** | (k.jn.l.mê) Ji xewrabûn.Agehdarbûn. Bi agehhatin. Berhevbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Hişyarî** | (n.dar.mê) Ne nivistin. Çelengî. Zêrevanî. |
| **Hişyarkirin** | (k.jn.l.mmê) Ji xewrakirin. Agehdadrkirin. Ez dil nadem ji xew hişyar bi kem. (K) bn: Kirin. |
| **Hivdeh** | (hijn.çend) Hevdeh. 17. |
| **Hivdehem** | (hijn.çend) Ya/yê/yên hevdê. |
| **Hizar** | (hijn.çend) Hijmêareke. 1000. |
| **Hizêlk** | (n.dar.mê) Çaleke fêqî tê dixin.:Evê zivistanê em dê bi fêqî xinê bîn, çunkî hizêlka pire. |
| **Hizir** | (n.x.mê) Bîr. Aşûp. : Hizrek hat bîra min. : Ez herê di hizirêd wî da. |
| **Hizirîn** | (k.jn.x.mê) Hizirkirnn. (K) bdn: Ez di hizirim em di hizirîn ,tu di hizirî hûn di hizirin, ew di hizire[…it] ewan di hizirin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : ez di hizirîm em di hizirîn, tu di hizirî hûn di hizirîn, ew di hizirî ewan di hizirîn. Db,dûr : ez hizirîbûm em hizirîbûyn, tu hizirîbûy hûn hizirîbûn, ew hizirîbû, ewan hizirûbûn(bi bû). (F) : bi hizire, bi hizirin. |
| **Hizirkirin** | (k.jn.l.mê) Bîrkirin. : Hizra xwe bi ke dûra biryarê bi de. (K) bn: Kirin. |
| **Hizirvan** | (pîşn.dar.dz) 1. Kesê nivîsînên hizirî di danit. Xudanhizir. 2. Navê zelamane. |
| **Hizirvanî** | (karn.dar.mê) Karê hizirvanan. |
| **Hîç** | (pêrb.neyînî) Ne çi . Tune. : Hîç kes,der, tişt û htd. |
| **Hîlandin** | (k.jn.x.mê) Dengê hespan. Gihîn. :Hesp ji tirs û birsê di hîlîne. |
| **Hîlhîl** | (n. dar.mê) ***deng*** Dengê kenîya mirovan dema ji dûr ve bilind di be. :Eve çi hîlhîle, ma we çi bihîste ?. |
| **Hîm** | (n.x.nêr) Bingeh. Gengiste. |
| **Hîmdanan** | (k.jn.l.mê) Bingeh danan. Gengiste danîn. |

| | |
|---|---|
| **Hîmdaner** | (kar,n.l.dz) Kesê berê hîmê di dane. Kesê bingehê di dane. |
| **Hîmdanîn** | (k.jn.l.mê) Hîmdanan. :Hîmê gundekê serdem hat danîn. |
| **Hîn** | (pêrb) ***rêzman*** Hêşta. :Ew hîn xuya nebûye. |
| **Hîna** | (pêrb) ***rêzman*** Hîn.Ta niha. |
| **Hînan** | (k.jn.xmê) Înan. Anîn. Ez di hînim. Hûn di hînin, bi hîne. (K)bn: Înan. |
| **Hînbûn** | (k.jn.l.mê) Fêrbûn.(K): ez hîndibim em hîndibîn, tu hîndibî hûn hîndibin, ew hîndibit ewan hîndibin.(F): hîn bibe hînbibin. |
| **Hînga** | (hk.dem) Hîngê. Hingê. |
| **Hîhik** | (hn.dar.çewa) Hûnik. Fênik. :Rojeka hînik. |
| **Hînkirin** | (k.jn.l.mê) Fêrkirin. : Mamosta qutabîyan hînî mûzîkayê di ke.(K) bn: Kirin. |
| **Hîphop** | (n.dar.mê) Darîn.Darînqûz. :Were em herin yarîya hîphopê. |
| **Hîphopkirin** | (k.jlgl.mê) Bi hîphopê lîstin. Zarokên hîphopê di ken. (K) bn:Kirin. |
| **Hîr** | (hn.x.çewa) 1.Hûr. Biçûk. :Ew peyayekê hîre. BrxGir. 2. Pirt. Ker. |
| **Hîrandin** | (k.jn.x.mê) ***deng*** Gihîna hespan. :Hespî hîrand. |
| **Hîrbûn** | (k.jn.l.mê) Biçûkbûn. Kerbûn. Pirtbûn. Têkçûn. BrxGirbûn. (K) bn : Bûn. |
| **Hîrde** | (n.dar.nêr) Pareyê hîr, wek sênt, filis. |
| **Hîrê** | (gaznx.mê) 1. Naznav û navê bangkirina jina hîr. 2.Navê jinane. |
| **Hîrik** | (hn..dar.çewa)1. Pişka hîr. 2. Mirovekê hîr. 3. Dûr. : Hîrik hizira xwe bi ke. |
| **Hîrkirin** | (k.jn.l.mê) Pirtkirin. Kerkirin.(K) bn: Kirin. |
| **Hîro** | (hd,gazn.dar.nêr) 1. ***rêzman*** Gazîkirin jibo zelamê hîr. 2. Navê mêrane. |
| **Hîşar** | (n.x.mê) Dersokeka tenik û rengîne jin di êxin pora xwe.Hîjar. Hîzar. |
| **Hîv** | (n.x.mê) bn :Heyv. |
| **Hîvî** | (n.x.mê) Daxwaz. Hez. Vîyan. Xewin. :Hîvîya min serkevtina te ye. |
| **Hîvîdar** | (hn.dar.çewa) 1. Kesê hîvîyan di xwazit.2. Navê kur û kiçane. |
| **Hîvîkirin** | (k.jn.l.mê) Daxwazkirin. (K) bn : Kirin. |
| **Hîwa** | (n.x) Hîvî. |
| **Hîzar** 1 | (n.x.nêr) Mişar. |
| **Hîzar** 2 | (n.x.mê) Hîşar. |
| **Hîzil** | (cugir,n) Çemeke[rûbar] li Kurdistanê. |
| **Ho** 1 | (n.x.mê) Eger. Sedem. |
| **Ho** 2 | (pêrb,gazî) ***rêzman*** Alavê gazî-bangkirinê.:Ho gavano!!!!. |
| **Hoba** | (hk.cih..x.mê) Cihê (aqarê) mirov lê xîvetan vedidin û xwecih di bin, jibo çerandina terş û kewalê xwe. Koçerat. |
| **Hodeng** | (n.dar.mê) ***rêzman*** Deng yan navên gazîkirinê, mîna; ho, wa, ey, gelo û htd. |
| **Hogir** | (hn.dar.çewa) 1. Mirovê bi tiştekî( xwarin, vexwarin)ê ve bi hêt girêdan û nekare bi hêle. 2. Navê mêrane. |
| **Hojîn** | (n.x.dz) 1. Gazîkirina jînê.Gazindekirin ji jiyanê.2. Navek kurdî du zayende. |
| **Hol** | (hk.cih,n.x.mê) Rex. Alî. Hêl. |
| **Holenda** | (hk.cih,cugir,n) Welatek ewropayî ye. |
| **Holendî** | (malb,n) 1. Kes yan zimanê holendî. 2. Mitayê Ji Holenda. |
| **Holik** | (n.x.nêr) Kolk. Kol. Zinc. |

| | |
|---|---|
| **Honer** | (n.x.mê)1. Tiştê têkelî bi kelepor,çand mûzîk, htd heye.Huner. 2. Navê jinane. |
| **Honermend** | (pîşn.dar.dz) 1. Kesê ji honerî dizanit, şareza bit.2. Navê kurane. |
| **Honermendî** | (karn.dar.mê) Karên honermend di kin. |
| **Hophopk** 1 | (n.dar.mê) ***tewal*** Corekê balindeyane. |
| **Hophopk** 2 | (n.dar.mê) Darînqûz. |
| **Hophopkanê** | (n.dar.mê) Yarîya hophopkê. :Zarok hophopkanê diken. |
| **Hosa** | (pêrb.pêvegir) ***rêzman*** NîŞadana mînakekê. Fêrkirin. Rasterêkirin.Berdewambûn di peyvîna da. :Hosa ne bêje. Hosa diriste. Hosa hat û hosa çû. Hosa rindtire. |
| **Hosajî** | (pêrb.dar) ***rêzman*** Herhosa. Hosa. |
| **Hosta** | (pîşn.x.dz) 1.Kesê pispor di warê avarkirina xanî û piran da. ***Pend*** :Hosta ne ji dil kir, dîwar xwar kir. Gareza. Seyda. Pispor. |
| **Hostayî** | (karn. mê) Karê hotayan. Karê avakirina xanîyan. Garezayî. :Hostayî karekê bi mifaye. |
| **Hostayîkirin** | (k.jn.l.mê) Weke meriv karê hosta di ke; ango xanîyan ava di ke.: Niho tu çi kar di kî? Ez hostayî di kim.(K) bn: Kirin. |
| **Hoş** | (n.x.mê) Hiş. Ageh. |
| **Hoşdar** | (hn.dar.çewa) Xwedî hoş. Hişyar. |
| **Hoşdarî** | (n.dar.mê) Hişyarî. Agehdarî. |
| **Hoşdarîdan** | (k.jn.gl.mê) Agehdarkirin. :Nojdaran hoşdarî daye welatîyan ,ko fêqîyê neşûştî ne xun. |
| **Hoşeng** | (n.dar.dz) 1. Hişyar. 2. Navek kurdî duzayende. |
| **Hotov** | (pêrb.pêvegir) ***rêzman*** Hosa. Wetov. |
| **Hov** | (hn.x.çewa) Mirov yan desteya dûr ji sincê mirovantîyê. Xwînmêj. Dirinde. Bêwujdan. :Rijêmeka hov. :Dujminê hov. |
| **Hovberî** | (n.dar.mê) Dirindeyî. Xwînmêjî. |
| **Hovîtî** | (n.dar.mê) Dirindeyî. Xwînmêjî. :Hovîtî a dujmin. |
| **Hoz** | (n.x.mê) Malbat.Ûcax. Êl. Eşîr.Civak. :Hoza biradostî. Hoza Gikak. |
| **Hozan** | (n.x.mê) 1. Hesbest. Riste. .:Hozana kilasîk. Hozana nûxaz. 2. Stiranbêj. 3. Navê keçan û xortane. |
| **Hozanvan** | (karn.dar.dz) 1. Yê hozana di nivêse. Kesê helbestan di vehîne. 2. Navê mêrane. |
| **HSK** | (kurtkirî) Heyva Sora Kurdistanê.Rêxistîyeke alîkarîya qurbanîyên çam û cengan di ke. |
| **Hulû** | (hn.x.çewa) Hilû. |
| **Humban** | (n.x.mê) Himban. |
| **Hundir** | (nl.mê) Navîn . Navxwe.Di nav da. |
| **Huner** | (n.x.nêr) Honer. |
| **Hunermend** | (pîşn.dar.dn) Honermend. |
| **Hunermendî** | (karn.dar.mê) Honermendî. |
| **Hur** | (n.x.nêr) Bayek bihêz. Bahoz. :Duhî hirekê mezin hat. |
| **Hurdar** | (hn.dar.çewa) Bi hur. Rojeka hurdar;ang rojeka bi hur. |

| | |
|---|---|
| **Hurmiz** | (n.x.kevin) ***kevin*** Xuda di dînê badînî da[ zerdeştî]. |
| **Hurûba** | (hn.n.l.mê, çewa) Hur. Toz. Hurdar.Bahoz. :Jiber hurûbayî em nikarin ji mal derkevin. |
| **Hûçik** | (n.x.nêr) Hiçik. |
| **Hûnîn** | (k.jn.x.mê) Vehandin. |
| **Hûphûpik** | (n.dar.mê) ***tewal*** Hophopk. |
| **Hûr** | (hn.x.çewa) Hîr. Brx Gir. |
| **Hûrbîn** | (n.dar.mê) 1. Mîkroskop.2. (hn.l.çewa) Mirovê di kar û kiryaran da hûrik û rêkûpêk. |
| **Hûrbûn** | (k.jn.l.mê) Hîrbûn. Çavên wî hûr bûne.Brx Girbûn. |
| **Hûrkirin** | (k.jnl.mê) Hîrkirin. Pirtkirin. : Pîvazan hûr bi ke. Giyayî hûr di ke.BrxGirkirin. |
| **Hûrhûr** | (hn.dar.çewa) Gelek hûr. Pirtpirt.:Hûrhûr baranê lê kir. |
| **HTD** | (kurtkir) Heta dûmahîyê.Heta dawîyê. |
| **HWD** | (kurtkir) Herwekî din. Herwesa. Heta dawîyê. |

# I

| | |
|---|---|
| **I** | Pîta yazehê ji abeya kurdî. |
| **Incîl** | (n.x.mê) Încîl. |
| **Ingirandin** | (k.jn.x.mê) Hêriskirin. Torekirin. (K) Bdn: ez di ingirînim em di ingirînîn, tu di ingirînî hûn di ingirînin, ew di ingirîne [..it]ewan di ingirînin.Pr:dê bi + bdn. Bdb: di ingirand, di ingiranddin.Db,dûr: ingirandibû, …bûn. (F): bi ingirîne, bi ingirînin. |
| **Ingirîn** | (k.jn.x.mê) Torebûn. Hêrisbûn. (K) bdn: ez di ingirim emdi ingirîn, tu di ingirî hûn di ingirin, ew di ingire[…it] ewan di ingirin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : di ingirî, di ingirîm, di ingirîn. Db,dûr :ez ingirîbûmem ingirîbûyn, tu ingirîbûy hûn ingirîbûn, ew ingirîbû, ewan ingirîbûn(bi bûn). (F) : bi ingire, bi ingirin. |
| **Inirîn** | (k.jn.x.mê) Torebûn. Enirî. (K) bdn : ez d inirim em di inirîn, tu di inirî hûn di inirin, ew di inire[…it] ewan di inirin. Pr : dêbi +bdn. Bdb : ez di inirîm em di inirîn, tu di inirî hûn di inirîn, ew di inirî ewan di inirîn.Db,dûr :ez inirîbûm em inirîbûyn, tu inirîbûy hûn inirîbûn, ew inirûbû, ewan inirîbûn,(bibûn). (F) : bi inire, bi inirin. |
| **Int** | (hn.x.çewa) Bêhintengî. |
| **Intên** | (hn.dar.çewa) ***deng*** Ji kerban da dengek ji mirovî di hêt. Kerb. |
| **Intênhatin** | (k.jn.l.mê) Dengê intênê ji kerban ji mirovî di hêt. : Bi erdî keft intên jê hat. : Ji kerban da intên jê hat.(K) bn : Hatin. |
| **Istekan** | (n.x.mê) Piyale. |

# Î

| | |
|---|---|
| **Î** | Pîta duwazdehê ji abeya kurdî. |
| **Îblîs** | (n.biyan.nê) Xudayê şer û xirabîyê. |
| **Îca** | (pêrb) ***rêzman*** Evca. Vêcarê. |
| **Îcax** | (n.x.mê) Êl . Hoz. Tîre. Malbat. :Tu ji lîjan îcaxê yî?. |
| **Îdis** | (n.x.cîha.mê) Nexweşîyeka kujeke, bi rêya guhnelî xwînê di hêt veguhaztin. |
| **îflîc** | (n.x.mê) ***derd*** falince. |
| **Îflîcbûn** | (k.jn.l.mê) Nesaxbûn bi falincê.Rastî nexweşîya falincê hatin. |
| **Îhanet** | (n.x.mê) Xwefirotin. |
| **Îhanetkirin** | (k.jn.l.mê) Xwefirotin. |
| **Îlon** | (hk.dem.x.mê) Meha êkê ji werzê payîzê. Meha neh.Eylol.:Goreşa îlonê. |
| **Îm** | (cih.x) ***rêzman*** Ev. Eve. |
| **Îmam** | (nbiyan.x.nêr) Zanayî olî[dîn] yê ko gotarên dînî ji bo musilmanan di bêjit, nexasim rojên înî. . mela. |
| **Îmro** | (hk,dem) Evro. Îro. |
| **Îmsal** | (hk.dem) Evsal. Îsal. |
| **Îmza** | (n.x.mê) Hêmaya nemaze ya kesekî jibo pejirandina her krekî, ko her mirovek îmzayeka nemze liser kaxezê bi kar di hînit.Mor. |
| **Îmzakirin** | (k.jn.l.mê) Mirov îmzaya xwe liser kaxezê di ke. Morkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Îmzakirî** | (hk.çewa) Hatî îmza kirin. Morkirî. :Kaxeza îmzakirî. |
| **În** | (hk.dem. mê) Roja bêhinvedan ji karî û nizakirin li cem musilmanan.Eynî. |
| **Înan** | (k.jn.x.mê) Anîn. Hînan. :Te jin înaye?. :Here xwarinê bo xo bîne. (K) bdn: ez di înim em di înîn, tu di înî hûn di înin, ew di îne[…it]ewan di înin. Pr:dê + bdn. Bdb : di îna, di înan. Db,dûr : înabû, …bûn. (F): bîne bînin. |
| **Înandin** | (k.jn.x.mê) bn : Înan. |
| **Înca** | (pêrb) ***rêzman*** Evca. Vêca. |
| **Încîl** | (n.x.mê) Kitêba pîroz ya dînê mesîh. |
| **Îngilîz** | (malb.) 1.Kesên ji neteweya îngilîzî. |
| **Îngilîzî** | (n.dar.mê) Zimanê yan kelûpelên îngilîzan. |
| **Înî** | (nx.mê) bn : în. |
| **Îprax** | (n.x.mê) Xwarineka kurdîye belg, bîber, kulind, hd, pir birnc û goşt dikin dilênin. |
| **Îran** | (hk.cih.wel.x.mê) Welatê îran. |
| **Îranî** | (malb,n.dar) Kes yan tiştê îranê. |
| **Îraq** | (hk.cih.wel,nx.mê) Welatê Iraqê.Weletê ereb,kurdan û neteweyên din. |
| **Îraqî** | (malb,n.dar) Kes yan tiştê ji îraqê. |
| **Îrlanda** | (hk.cih.wel,n) Welatek ewropayîye. |
| **Îrlandî** | (malb,n) Xelik yan mitayê ji îrlanda. |
| **Îro** | (hk.dem) Evroj. Evro. :Emê îro herin mala cîranê xwe. :Îro roja yekê ye ji payîzê. |
| **Îroke** | (hk.dem) Evroke. Evro. |

| | |
|---|---|
| **Îroyîn** | (hn.çewa) Tiştê îro. Mitayê evro. : Nanê îroyîn.Rojnameya îroyîn. |
| **Îsal** | (hk.dem) Evsale. Evsal. : Îsal em dê herin seredana kurê xwe li dervey welat. |
| **Îsk** | (n.x.mê) Ji egera xwarinê hind caran dengek mîna fîtê digel bayî ji gerîya mirov di devî ra di derkevit bê viyan |
| **îskandinavî** | (nej,n) Xelikê welatên îskandinavîya. |
| **îskdan** | (k.jn.I.mê) Dema îsk ji mirovî di hên. |
| **îskkirin** | (k.jn.I.mê) bn: îskdan. |
| **îskvedan** | (k.jn.I.mê) bn :îskdan. |
| **îslam** | (din,n.x.mê)Dînê musilmanan. :Piranîya kurdan îslamin. |
| **îslamî** | (dîn,n. dar) Mirovê ku bawerîya wî bi ola îslamê heye. bawerî û rewiştên îslamê. |
| **îsrayîl** | (hk.cih.wel,n) Welatê îsrayîlîyan. |
| **îsrayîlî** | (nej,n.dar) Xelikê yan ji welatê îsrayîl. Mitayê îsrayîlî. |
| **îstgeh** | (n.dar.mê) îzgeh. |
| **îstîkan** | (n.x.mê) Perdaxa çayê. Piyale. |
| **îş** | (n.x.nêr) Kar. Şol. :îşê min pire. : Tu çi îş di kî?. |
| **îşev** | (hk.dem) Evşeve. :îşev cejin a Newroze. îşev ez na nivim jiberko filmekê xweş heye. |
| **îşî** | (n.x.nêr) 1. Bireka dan ,dindikan bihevre. Çend tilîyên tirî bi katekêve. 2. Çend kes bi<br>hev ra piyasek yan rêpîvanekê rêxin. |
| **îşîkkêş** | (hn.I.çewa) Kesê serkêşîya desteyeka mirovan di ke, li dema rêpîvanan da. |
| **îşîkkêşan** | (k.jn.I.mê) Rêpîvan. Li hev civyan. Xwe nîşadan. |
| **îşk** | (n.x.mê) Girêya jibo tundkirina baran bi darekê qayîm çend caran di hêt badan bo peytkirina barî. |
| **îşkav** | (n.x.mê) Sindoq. Elbik. :îşkava nanî. |
| **îşker** | (kara.dar.dn) Mirovê rêncber. Pale. Karker. |
| **îşkirin** | (k.jn.I.mê) Karkirin. Şolkirin. (K) bn:Kirin. |
| **îşqilk** | (n.dar.mê) Lîztineke mirov li ser lingekî radiweste û lingê din bi destî ra di gire û di çe. |
| **îşqilkkirin** | ( k.jn.I.ê) Yarîya îşqilkê di kin. (K) bn: Kirin. |
| **îvan** | (n.x.nê) Navê mêrane. |
| **îtir** | (pêrb) rêzman Êdî. |
| **îzgeh** | (hk.cih.dar.mê) Cihê xirvebûna tirombêlan, pasan. bingehê belavkirinan, mîna tevizyûn, radyo.. |

# J

| | |
|---|---|
| **J** | (je) Pîta sêzdehê ji abeya kurdî. |
| **Jajerûn** | (n.l.mê) Xwarineke ji jajî û rûn ên di nav êk da qelandî di hêt berhevkirin. :Firavîn evroj jajerûne. |
| **Jajî** | (n.x.nêr) rêçai Berhemekê spîyatîye, ji dewê civirkirî di gel sîrkan yan giyayên din tê diristkirin di ken cerkan. Rêçal. |
| **Jajîrûn** | (n.I.mê) Jajerûn. |
| **Jakaw 1** | (hn.x.çewa) Hov. Kûvî. Dirinde. |
| **Jakaw 2** | (hn.x.çewa) Qurmiçî. |
| **Jan** | (n.x.mê) 1 .Êş. Derd. 2 kovan. : Jana min pir girane. |
| **Janazirav** | (n.l.mê) derd Nexweşîyeke li sihêd mirovî di kevit. Sile. |
| **Jandan** | (k.jn.I.mê) Êşan. Didanê min janan di dit. |
| **Jandar** | (hn.dar.çewa) Bi jan. Bi êş. |
| **Janeser** | (n.I.mê) Serêşan. :Jiber janeserê min hay ji xwe nîne!. |
| **Jangirtin** | (k.jn.l.mê) Jandan. |
| **Janê** | (n,gaz.dar.mê) Naznava jina leşêş. |
| **Jankirin** | (k.jn.I.mê) Jandan. Êşan. : Didanê min yê janan di ke. (K) bn: Kirin. |
| **Jano** | (n, gaz.dar.nêr) Naznavê mêrê leşêş. |
| **Japan** | (hk.cih.weln.mê) Welatê japanîyan. Yaban. Japon. |
| **Japanî** | (malb,n) Xelik yan tiştê Japanî. |
| | 343 |
| **Japon** | (hk.cih.wel,nhk,cih) Japan. |
| **Jar 1** | (hn.x.çewa) 1. Hejar. Belingaz. Melîl. :Zarokê bi jarî û jîrê hatîye xudankirin. 2. Jan. Derd. |
| **Jar 2** | (n.x.mê) Jehir. :Jara marî. :Jara zerkêtkê. |
| **Jarav** | (hk.da.çewa) Bijîn. Jêrav. |
| **Jaravbûn** | (k.jn.gl.mê) Bijînbûn. Paqijbûn. :Ev amane baş jarav nebûne!. |
| **Jaravkirin** | (k.jn.gl.mê) Piştî amanan di şon avekê liser di kin jibo kefa sabûnê pêve nemîne û bijîn bi be. (k) bn: Kirîn. |
| **Jaravkirî** | (hk.I.çewa) Amanên hatîne jaravkirîn. Bijîn. |
| **Jarbûn** | (k.jn.I.mê) 1. Hejarbûn. 2. Melûlbûn. Pend: Jin ji bêmêrî har di bin, mêr ji bêjinî jar di bin.(K) : Biin. |
| **Jarê** | (n, gaz.dar.mê) 1. Jina melûl û bê gêwil. Kovandar. 2. Navê jinane. |
| **Jarî** | (n.dar.mê) 1.Hejarî. Belingazî. 2. Melûlî. |
| **Jarîn** | (k.jn.x.mê) Girîn. Nalîn. |
| **Jarkevtin** | (k.jn.I.mê) Hejarbûn. |
| **Jarkirin** | (k.jn.I.mê) Hejarkirin. |
| **Jaro** | (gazn.nêr) 1 Nazanv û navê bangkirin ê peyayê jar û melîl. 2 Navê zelamane. |
| **Jebeş** | (n.x.nêr)/ev Fêqîyekê mezin, naviksor, dindik(tovik) reşe, pir av û tama wî şirîne. .Zebeş. |

| | |
|---|---|
| **Jehir** | (n.x.mê) Şileyeka kujeke li cem giyandaran ii giyayan heye. Jehir a mar, dûpişk, stêng, ii htd. |
| **Jehirdan** | (k.jn.l.mê) Candar û giyayên jehir ê di rêjin, di den. |
| **Jehirdar** | (hn.l.çewa) Candar û giyayên bi jehir. : Marê jehirdar. Brx Bêjehir. |
| **Jehirkirin** | (k.jn.l.mê) Dema candar yan giya jehirê di kin nav leşî. |
| **Jehrav** | (n.l.mê) Jehir û av bi hev ra. av û jehir êd têkel. |
| **Jehremar** | (n.l.mê) Jehir a maran. |
| **Jehrîn** | (hn.dar.mê) Xwedî jehir. Jehirdar. : Marê jehrîn. |
| | 344 |
| **Jem** | (n.x.mê) Danek xwarinê . Jema nîvro. Danê nîvro. Dem. Zeman. |
| **Jeng** | (n.x.mê) Madekê sorê ser qehweyî ve, ji egera av ketina ser asinî peyda di bit. |
| **Jengar** | (hk.dar.çewa) Asinê jengîbûyî. Asinê jengar; ango asinê jengdar. Jenggirtî. |
| **Jengdar** | (hk.dar.çewa) Jengî. Jenggirtî. |
| **Jenggirtin** | (k.jn.l.mê) Dema jeng asinî di girit. |
| **Jenggirtî** | (hk.l.çewa) Kanzayê jengê girtî. Jengîbûyî. |
| **Jengî** | (hk.dar.çewa) Jengê girtî. Asinê jengî. |
| **Jengîbûn** | (k.jn.l.mê) Jenggirtin. |
| **Jengîkirin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov kanzayekî, nemaze asinî li ber avê, baranê bi hêlit, tanî jeg di girit. |
| **Jengîn** | (hn.dar.çewa) Jengar. Jengdar. |
| **Jenîn** | (k.jn.x.mê) 1. Livlivîna ronahîyê ji dûrve. 2. Lêdana amûrên mûzîkê. Tembûr jenîn.<br>(K)bdn : ez di jenim em di jenîn, tu di jenî hûn di jenin, ew di jene[..it] ewan di jenin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : di jenî, di jenîn. Db,dûr :jenîbû, jenîbûn. (F): bi jene bi jenin. |
| **Jê 1** | (n.x.mê) Dav. Divêle. |
| **Jê 2** | (pêrb) rêzman Digel. Pêra. 3 Jinav. Lê. Ji wî,wê,wan, hewe, me û htd. Pend : Ne me jê û ne tê.ang ; me çi têkelî bi wê kiryarê ve nîne, ne ji dûr û ne ji nêz. |
| **Jêber** | (n.dar.mê) Pirteka lastîkîye jibo jê birina nivîsê bi kar di hêt. |
| **Jêbir** | (n.dar.mê) Jêber. |
| **Jêbirin** | (k.jn.l.mê) Nehêlana şûnwarê tiştî. Kêmkirin. Navê min jêbir. Yekê ji çarê bibe, di mînin sê. 4-1=3. (k) bn : Birin. |
| **Jêbûn** | (k.jn.l.mê) Jê peyda bûn. Jê ve kirin. :Ew li sala 1975 an ji dayk biiye. |
| **jêçûn** | (k.jn.l.mê) Ji nav çûn. Jê kêmbûn- kirin.: Nasnameya min kevte di avê da hemû nivîsîn jê çûn. :Dehan pênc jê bi çin di mînin pênc; 10-5=5. (K) bn: Çûn. |
| | 345 |
| **Jêder** | (n.dar.nêr) rêzman Jê der di kevit .Çavkanî. Lêker. :Jêderekê bawer pêkirî got; . . . , : Jêderê hat, hatine. : Jêderê çii çûn e. |
| **Jêderenav** | pêk di hêt. wek; karkirin. xwarin, hatin, mirinû htd. çend jêderenav hene: xurî mîna kirin, dan, kujtin, birin ii htd. darijtî: mîna dakirin, vekirin, |

| | |
|---|---|
| | dasepandin û htd. Lêkdayî: mîna karkirin, sertiraşîn, serjêkirin, jêkcudabûn ii htd. Gelek lêkdayî: mîna biserûberkirin, desttêwerdan û htd. Çavkanî. |
| **Jêgerîn** | (k.jn.l.mê) Bela xwe jê vekirin. Lêgerîn. Bi cih hêlan. Dest jê berdan. : Dê jê gere camêr !. |
| **Jêgirtin** | (k.jn.dar.mê) Tiştê mirovî bivêt ji yên din bigirit. hilbijartin. : Min ji xwe ra ciwantirîn qelem jê girt. (K): ez jêdigirim em jêdigirîn, tu jêdigirî hiin jêdigirin, ew jêdigirit ewan jêdigirin. (F): jêbigire jêbigirin. |
| **Jêgirtî** | (hk.l.çewa) Hilbijartî. Bijartî. |
| **Jêhatin** | (k.jn.l.mê) 1. Pêçêbûn. Karîn. Şiyan. Pend : Lêhatin çêtire ji jêhatinê. Ang; şens pêtir rolê xwe di lîze ji şiyana mirovî. 2. Li ser hatin. : Cilikên kurdî gelek ji te di hên. (K) bn: Hatin. |
| **Jêhatî** | (hk.l.çewa) 1. Kesê kiryar bi dest ve di hên.Bi kêrhatî. Hêja. Peyt. 2. Xwedî hêz. :Gizîrê gundê me mirovêkê pir jêhatîye!. |
| **Jêhelî** | (n.dar.nêr) Evrazî. Brx Jordanî. Pend :Her jêhelîyekî jordanîyek heye. |
| **Jêk** | (hn.dar.çewa) Ji êk. Digel êk. Bihevre.:Em dê lîstoka biranê bi kin ez û tu jêk. |
| **Jêkanê** | (n.dar.mê) Yarîyên(Iîstik) zarokan dema di bin birbir. Çend bir. Ref. : Ez, tu û haval jêk, û yên dî hemû jêk. |
| **Jêkanîn** | (k.jn.dar.mê) Jêgirtin. |
| **Jêkcudabûn** | (k.jn.ggl.mê) Cudabûn. Ji êk cuda bûn. |
| **Jêkcudakirin** | (k.jn.ggl.mê) Ji êk cuda kirîn. Ji hev dûr kirîn. Jêk ve kirin. |
| **Jêkçûnepas** | (k.in.ggl.mê) Ji hev dûr kevtin. Jêk silbûn. :Erê te zanîye cîranêt yêt jêk çûyne paş?. |
| **Jêkdûrkevtin** | (k.jn.ggl.mê) Ji hev dûr keftin. :Dujninan wesa li me kir ko em jê dû bi kevîn. |
| **Jêkirin** | (k.jn.l.mê) Jêk ve kirîn. Jêbirin. Jê derêxistin. Birîn. Piçandin. : Serê berxê jê kir. |
| | 346 |
| **Jêkkirin** | (k.jn.gl.mê) Ji hev dûr kirin. :Wan bêbextan em jêk kirîn. :Tivenga xwe jêk bi k!. |
| **Jêkvebûn** | (k.jn.gl.mê) Cudabûn. Jêk çûn paş. :Eve demhijniêreke du kelabang berbûne hev û hêj jêkve ne bûne. (K) bn : Bûn. |
| **Jêkvekirin** | (k.jn.gl.mê) Cudakirin. Ji hev dûr xistin. (K) bn : Kirin. |
| **Jêlelî** | (n.dar.nêr) Evrazî. Jêhelî. |
| **Jêr** | (hk.cih) Bin. Xwar Li xwar. : Gundê me di kevit jêr çiyayekê mezin. Brx Jor. |
| **jêrda** | (hn.da.biziv) Senta ber bi xwarê. Jibo binî.Ber bi Jêr. Brx Jorda. |
| **Jêrde** | (alv.biziv) bn : Jêrda. |
| **Jêrî** | (hn.çewa,hk.cih) Binî. Kurmancîya jêrî. Xwarê. Brx Jorî. |
| **Jêrîn** | (hn.çewa, hk.cih) Jêrî. |
| **Jêvekirin** | (k.jn.l.mê) Jêkirin. Qurtifandin. Birîn.: Çima te mînakê xwe ji dîwarî ve kir?.(K) bn: Kirin. |
| **Jêza** | (n.dar.mê) Nejad. Tuxim. Nivş. Resen. |

| | |
|---|---|
| **Ji** | (pêrh) rêzman Alavê girêdana hevokane. :Ji tera, ang; jibo te. :Ji Amed ta Duhok çende?. Ji meha avdarê ta xizîranê seqa yê Kurdistanê ê xweşe.: Ji te pêve min kes navê. |
| **Jibilî** | (pêrb) rêzman Alavê bijartinê. Bêy. : Hemû kes di karin pişkdarî ahenga me bi bin jibilî Aştî. Bijlî. |
| **Jiber 1** | (pêrb) rêzman Gotina di serê mirovî da dihêt tomarkirin û mirov bizanit bêy xwandin yan nêrîn. : Ev zaroke gotinêd nivêjan jiber di zane. : Helbesteka pir xweşe, lê mixabin ez jiber nizanim. |
| **Jiber 2** | (pêrb) rêzman Alavekê eger û mercane. : Jiber te ez ahtim. Jiber çi te we kir?. |
| **Jiberkirin 1** | (k.jn.gl.mê) Wane, helbest, çîrok û htd di mejî yê xweda tomar bikî ti bêy nêrîn bi karîbêjî.: Hozanvanî hemû hozanêd xwe jiber kirîne. (K) bn: Kirin. |
| **Jiberkirin 2** | (k.jn.gl.mê) Di ber xweda înan. Ji xwe kirin. Xwe ^ şelandin, gihorîn. Êxistin. : Cilên xwe jiber xwe kirin.: Sakoyê xo jiber xo kir.(K) bn: Kirin. |
| | 347 |
| **Jiberko** | (pêrb.merc) rêzman Alavê mercê ye. Ango. Çunkî. Jiberko Hêja qutabîyekê zîreke, mamostay xelat kir. |
| **Jibo** | (pêrb) rêzman Alavê hebûnê ye. : Jibo dîtina te ez hatim vêrê. |
| **Jibona** | (pêrb) rêzman Jibo. Jipêxemet.:Jibona serferazîya Kurdistanê me xebat kir. |
| **Jider** | (pêrb) Ji derve. Derve. : Ez ji der di hêm. Brx Jinav. |
| **Jidêla** | (pêrb) rêzman Alaveke jibo cihgirtinan bi kare. li Şûna. Li cihê. Pêşve. Bi navê. : Mamosta jidêla birêvebirî di axive. |
| **Jidil** | (hn.dar.cewa) Mirov karekî bi kêfa dilê xwe bi ke. Mirovî pê xweş bit. Pir. Gelek. :Ez jidil supasî ya te di kim ko tu hatî seredana min. : Em jidil pîrozî yê li te di kin jiber serkevtina te. |
| **Jih** | (n.x.mê) Kezîk. Dav. Simbêl. |
| **Jihevkirin** | (k.jn.gl.mê) Jêkvekirin. Cudakirin. : Dujminî em ji hev kirîn. |
| **Jihevxistin** | (k.jn.gl.mê) Jihevkirin. |
| **Jij** | (n.x.nêr) Goşt bizimanê zarokan. |
| **Jijî** | (n.X.dz) Candar Jîjî. |
| **Jikerve** | ji kherve (hn.dar.çewa) Jinişkêve. Bêdengîve. :Eve çi bo tu hema jikerve bi jor keftî ?. |
| **Jimare** | (n.x.mê) Hijmar. 1,2,3,4,.. |
| **Jimardin** | (k.jn.x.mê) Hijmartin. |
| **Jimartin** | (k.jn.x.mê) Hijmartin. |
| **Jimeboştir** | (n..I.dz) Jimeçêtir. |
| **Jimeçêtir** | (n.I.dz) bn : Ecine. |
| **Jimêje** | (hk.dem) Dema derbazbûyî. Berî noke. Di kevin da. : Kengî xandina te bi dawî hat?. Jimêje. : Ji mêje em li benda vê rojê. |
| **Jimêryar** | (n.dar.mê) Amêrê hijmartinê. |
| **Jimêryarî** | (kara.dar) Xwandin yan karê hijmaritin û jêk vavartina perê di hêt ii di hêt mezaxtin. |

| | |
|---|---|
| **Jimêrvan** | (pîşn.dar.dz) Kesê karê hijmartin û vavartina hatî mezaxtinê di ke. |
| | 348 |
| **Jin** | (n.x.mê) Zayendêmê yê mirovan. Nivşê mirovan yêd mê. Pîrek. Afret. Kulfet. Pend: Jin male binyat xanî, mixabin jina baş bikevit destê nezanî. Pend :Jina xirab berde, mêrê xirab derde. Pend :Jinin mêran pêş di xin. Pend : Jinê bihîne ji malan mizgînîyê bi de xalan. Pend :Jina bêkes, nanê reş, dewê tirş, mala min xirab di Kin.pend : Jinê çav lidere, mêr xwelî sere. Pend : Jin stûna malê ye. Pend :Jin heye terşa malê, jin heye rewşa malê. Pend :Jinê, were pişta minê, da te bigêrînim li dinê, dayka minê bela serê minê. Pend : Jin hene gula mêrê xwene, jin hene kula mêrê xwene. Pend :jin gula malane, jin derdê mêrane. Pend :Jina baş, şûrê pişta mêrane, ya xirab derdê êşa girane. Pend :Jin kanîya jînê ye, dil kanîya vînê ye. Pend : Jinan çav li jinan kir, mala mêran xira kir.Pend :Karên jinan, bîsûçarin, du jê di diyarin, ewjî nan û girarin. |
| **Jinane** | (hn.dar.çewa) 1. Nivşê mê.2. Cil, pêlav, zêr kar ii htd yêd jinan. : Ev kirase jinaneye!. |
| **Jinanîn** | (k.jn.I.mê) Jin anîn. Jin înan. Jinînan.Cotbûn. (K) bn: Anîn. ;Wî xortê hat hêjta jin ne anîye?. |
| **Jinap** | (n.l.mê) Jina apê mirovî. Jinmam. |
| **Jinbab** | (n.l.mê) Dema bab jineka din liser jina xwe ya xwedî zaro di hînit yan piştî mirin yan berdana daykê. Jina babê. Zirdayk. Pend :Jinbabê, kafirbabê, ez birsîme li pişt dolabê. |
| **Jinbav** | (n.l.mê) Jinbab. |
| **Jinbira** | (n.l.mê) Jina birayê mirovî. |
| **Jinbîra** | (n.l.mê) Jina birayê jina mirovî. Jina xizim ê mirovî. |
| **Jinebî** | (n.dar.mê) bn : Bîjin. |
| **Jinik** | (nanz,n.dar.mê) Nazikkirina jin ê. Jin. |
| **Jinişkêve** | (hn.çewa) Demildest. Êksêr. Ji xafilkîve. |
| **Jinînan** | (k.jn.I.mê) Dema jinek digel mêrekî girêbenda hevjînîyê îmza di kin. Dema^mirov jinê di hînit. Avaîdrina xêzanê. Markirin. (K) bn: înan. Pend :Jinê bîne ji eslîya avê bîne ji kanîya da bibînî xweşîya. |
| **Jinkok** | (naz,n.dar.mê) Nazkkirin yan biçûkkirina jinê. Pend : Jin hene û jinkok jî hene. Ang; jinên çak û xirab hene. |
| **Jinmam** | (n.l.mê) Jina birayê babê mirovî. Jina mamê mirovî. Jinap. |
| **Jinpisman** | (n.l.mê) Jina pismamê mirovî. Jina kurê mamê mirovî. |
| | 349 |
| **Jinpisxal** | (n.l.mê) Jina kurê xalê mirovî. |
| **Jintî** | (n.l.mê) Jina birayê mêrê her jinekê. |
| **Jinxal** | (n.l.mê) Jina birayê dayka mirovî. Jina xalê mirovî. |
| **Jivan** | (n.x.mê) Dema mirov di gel êkî rê bi kevit jibo hev dîtinekê li dem û cihêkê diyarkirî. Pend : Jivana jîjî,ang; eger mirovî jivan di gel êkî hebû, û diyar nebû. Jivana bê wic. |
| **Jixwe 1** | (hn.dar.çewa) Bê mifa. Bêwic. Kêrnehatin. |

| | |
|---|---|
| **Jixwe 2** | (pêrb) Bo agehdarî. Jibo zanîn. Herçende. |
| **Jiyan** | (k.jn.x.mê) 1.Candarên di karin bêhina xwe bi stînin û derêxin, xwarinê di xwen, di bizivin, werarê di kin. Brx Mirin. (K) bdn : ez di jîm em di jîn, tu di jî hûn di jîn, ew di jî[..ît] ewan di jîn. Pr :dê bi + bdn. Bdb : ez di jiyam, tu di jiyay, ew di jiya, hûn, ewan, em di jiyayn. Db,dûr : ez jiyabûm, tu jiyabûy, ew jiyabû, em jiyabûyn, hûn, ewan jiyabûn. (F) : bi jî, bi jîn. 2. Navê keçane. |
| **Jiyandin** | (k.jn.mê) Wekî mirov çavdêrîya candar yan darûbarî di ke ta bijî. |
| **Jiyanname** | (n.l.mê) Mirov dîroka jiyana xwe yan ya yekî di nivîse, yan tomar di ke, kanê çi kirîye, ji kîrê ye, kî bû û htd. |
| **Jî 1** | (n.x.nêr) Temen. :Jîyê te çende ?. :Xudê jîyê te gelek dirêj ke. |
| **Jî 2** | (pêrb) rêzman Alavê hevberkirinê. Weke hin kar, kiryar, tişt endam li htd wekhev bin. : Ez jî wek te qutabîme. :Ew jî ji Kurdistanê hatî ye. : Gotina te jî raste. |
| **Jîjik** | (n.x.dz) bn: Jîjî. |
| **Jîjî** | (n.x.dz) Jûjî. Giyandarek kûvî, bi sitirîyan dapoşîye. Pend :Jîjîko, daygorîko, bê stirîko,. Ang ; herkes pesina tiştê xwe di de. |
| **Jîman** | (n.dar.dz) Navek kurdî dutuxme. |
| **Jîn** | (n.x.mê) Jîyan. |
| **Jîndar** | (hn.dar.çewa) Yê ko di jî. Candar. Jiyandar. |
| **Jîndarî** | (n.dar.mê) Jiyan bi ser birin. Dinyadarî. |
| **Jîndewar** | (hn.dar.çewa) Candar. Zîndewer. |
| **Jînenîgarî** | (n.l.mê) Jiyanname. |
| **Jîngeh** | (hk.cih,dar.n.mê) Cîyî jîyana giya ii giyandaran. :Pêdvîye em jîngeha Kurdistanê bi parêzin. |
| | 350 |
| **Jlînhat** | (n.dar.dz) Navek kurdî yê jin yan û mêrane. |
| **Jînjan** | (n.I.dz) Navek duzayende. |
| **Jînsal** | (n.l.mê) Temen. Jî. |
| **Jînvan** | (ndar.dz) Navek kurdî duzayende. |
| **Jînwar** | (n.I.dz) Navek kurdî duzayende. |
| **Jînyar** | (n.l.dz) Navek kurdî duzayende. |
| **Jîr** | (hn.x.çewa) Mirovê jîr, ang; mirovê zîrek, hoşmend. :Zarokê Jîr. |
| **Jîrane** | (hn.dar.çewa) Zîrekane. Pehlewanî. Hişyarî. |
| **Jîrî** | (hn.dar.çewa,n.mê) Zîrekî. |
| **Jo** | (pêrb) bn: Jibo. |
| **Jojî** | (n.x.dz) bn: Jîjî. |
| **Jor** | (hk.cih) Serî. Bakûr. Evraz.Ode. |
| **Jorda** | (hn.çewa) Bizava ber bi serîve. Serevraz. Ber bi jor.Brx Jêrda. |
| **Jorde** | (hn.çewa) bn: Jorda. |
| **Jûjî** | (n.x.dz) Jîjî. |
| **Jûr** | (hk.cih.n.x.mê) Mezel. Olîk. Eywan. Xanîyê wê ji pênc jûran pêk di hêt. |
| **Jûrî** | (hk.cih.mê) Serî. Bakûr.Brx Jêrî. |

# K

| | |
|---|---|
| **K** | (ke) Pîta çardehê ji abeya kurdî. |
| **Ka** | 1.(pêrb) rêzman Alavê pisyarkirina kesek yan tiştek nedîyar. :Ka Azad?. :Ka pirtoka min?. :Ka tu li kîve yî?. |
| **Ka** | 2 (pêrb) rêzman Alaveke jibo daxwazê bi kar di hêt.: Ka bêzehmet were vêrê. :Ka dê rawese camêr!. : Ka tu bi xudê bêdeng bi be!. |
| **Ka** | 3 (n.x.mê) kha Qesela genim yan ceh, piştî cencerkirinê danî jê cuda di kin, jibo alîka candaran bikar di hêt. |
| **Kab** | (n.x.nêr) Hestîyekê navbera gehên pêyên kewalî piştî vekuştina wan di hînin der jibo mezin li zarokan, pê di lîzin. |
| **Kabanê** | (n.dar.mê) Yarîyeke(lîstik) bi hilavêtina kaban , eger kete ser tîyekê xwe yê çal, bi xalekê ye , ser tîyê hilî bi du xalane.Pend :Kabê bêvan kesî yê hatî.Ang: bo mirovê bi şens û bextsipî di hêt gotin. |
| **Kabanêkirin** | (k.jn.I.mê) Bi kaban lîztin. :Werein gelî gundîyan da kabanê bi kîn. |
| **Kabanî** | (n.x.mê)1. Jina karê malê bi rêve di bit. Xwedîya malê. 2. Jina mêrkirî. :Kabanîya Serdarî ya nesaxe. Pend: Xwarina du kabanî çêken dê ya swîr yan bêxwê bit. |
| **Kabgolik** | (hn.I.çewa) Mirovê kabên wî mîna yên golikan stûr.ango :Hestîgiran. Dargiran. |
| **Kabira** | (n.dar.nêr) Kesek nediyar. Navînay. Navbirî. :Evro kabirayekî gundor li kolanê di firotin. |
| **Kabîne** | (n.biyan) 1. Hukmet. : Kabîneya çarê ya HHK.2. Jor yan fagone. |
| **Kabînet** | (n.biyan) bn: Kabîne. |
| **Kaçanî** | (n.x.pir) Amanên xwarinê. Aman. :Kaçanîyan jarav bi ke. |
| **Kaçik** | (n.x.nêr) Amêreke ji dar yan hesin (fafon) hatîye çêkirin mirov jibo xwarin û vexwarinê bi kar di hînin, pir cor, reng û qebare hene wek: kaçikên xwarinê, çayê, zadlênanê û htd. Kefçik. |
| **Kadan** | (n.dar.mê) bn: Kadîn. :Ka di kadanê da rizî. :Kadana kayê. |
| **Kade** | (n.x.mê) Nanek nexasime, girkên biçûk yên hevîrî pir di kin ji gwîz, xurme, kakilbahîv, û htd, di tenûran da sor di kin jibo rojên cejin û şahîyan. Sawik. Kolîçe. |
| **Kadir** | (n.biyan.dz) Kesê zanîn di her warî da hebin wek; ramrarî, teknîk, nojdarî û htd bi xwandin û rêya zandoran . Şareza . Pispor. |
| **Kadiz** | (n.I.dz) Mirovê dizîya kayê di kit. Rêya kadizan; Xîçeka spî li asmanan jiber ko wek kayê diyare bi (rêya kadizan) navkirîye. |
| **Kadîn** | (n.dar.mê) Cîyê yan xanîyê kayê têda di higirin. Kadan. |
| **Kafir** | (hn,biyan.çewa) Mirovê karên dijî qanûnên şrî`tê bi ke, ji rêya xwedê derkevtî. xudênenas.Bêbawer. |
| **Kahîn** | (n.dar.mê) Navê jinaye. |
| **Kaj** | (n.x.mê) Dareka xemildar û ciwane herdem ya keske li Kurdistanê gelek cor hene. Sinewber. |

| | |
|---|---|
| **Kajistan** | (n.dar.mê) Baxê kajan.Daristana tenê kajan. |
| **Kajîn** | (n.n.l.mê) 1.Hîvîya jîyanê. Lêgeryan jibo jîyanê. 2. Navê keçane. |
| **Kak** | (n.x.nê) 1. Bira. Birayê mezin. 2. Hêja. Mîrza. |
| **Kake** | (n.x.nê) 1. Gazîkirina kak.2. Navê mêrane. |
| **Kakêşan** | (k.jn.l.mê) Kêşana kayê. Kêşa kayê. Rêya kadizan. |
| **Kakijk** | (n.x.mê) Giyeke li çîyan hişîn di be di hêt xwarin dema bizdandina bistîkên wê, şîr jê tê. |
| **Kakil** | (n.x.mê) 1. Navika mitayê hişk û req, wek bahîv, gûz, htd. Navik.2. Navê mêrane. |
| **Kakilbahîv** | (n.l.mê) Kakila bahîvê.: Kakilbahîv kirin nav birincê. |
| **Kakişk** | (n.x.mê) bn :Kakijk. |
| **Kal** | 1 (hn.x.çewa) 1. Pîr.Sere. 2. Berebab. Ji papîrî pêhel. |
| **Kal** | 2 (hn.x.çewa) Rengê sorê tarî.bizna kal. |
| **Kalan** | (n.x.nêr) bn: Kavlan. |
| **Kalbapîr** | (n.l.nêr) Bapîrê mezin. Mêrê navsal. Gelek pîr. |
| **Kalbûn** | 1 (k.jn.l.mê) Pîrbûn. Kevinbûn. Navsalveçûn.:Zava û bûk pêkve pîr û kal bi bin.(K) bn: Bûn. |
| **Kalbûn** | 2 (k.jn.l.mê) Sorbûn. |
| **Kale** | (n.x.mê) Corekê pêlavên nerim in, jin û mêr li pîyêd xwedi kin. |
| **Kalek** | (n.x) fêkî Gundor. |
| **Kalekal** | (n.dar.mê) deng Dengê bizinan. Maremar.Barebar. :Kalekala bizinê ye, jiberko ya birçî ye. |
| **Kalekalkirin** | (k.jn.gl.mê) Marîna kewalan(bizinan). |
| **Kalemêr** | (n.l.nêr) Pîremêr. :Hêja mirovek kalemêre êdî nikare here nav baxî. |
| **Kalepîr** | (hn.l.çewa) Mirovê gelek pîr. |
| **Kalepîrî** | (n.l.mê) Pîrî. Pîratî. |
| **Kalê** | (gazn.dar.mê) Naznav û gangkirina jina sor, yan kelan lam û guh sor. |
| **Kalik** | 1 (n.dar.nêr) Bapîr yan babê bapîrî. |
| **Kalik** | 2 (n.dar.mê) kevin Pêlaveka nemazeye bin lastîk û teniştên wê bi bendikan hatîye raçandin. Kalik û gore. |
| **Kalî** | (hn.dar.çewa) Pîrî. Kevinî. |
| **Kalîsk** | (n.x.mê) bn:Galiske. |
| **Kalo** | (n.gaz.nêr) 1.rêzman Bangkirina mirovê kal(pîr).2. Navê mêrane. |
| **Kam** | (pêrb) rêzman Alavê pirsînê û jêgirtinê. Kî. Kê. Kîjan. |
| **Kambax** | (hn.dar.çewa) Bêbext. Xwelîser. Wêran. Kembax. |
| **Kambaxbûn** | (k.jnl.mê) Xirabûn. Wêranbûn.(K) bn: Bûn. |
| **Kambaxkirin** | (k.jn.l.mê) Wêrankirin. (K) bn: Kirin. |
| **Kamêra** | (n.biyan.mê) Amûrê girtina mînakan. Amêrê wênegirtinê. |
| **Kamêre** | (n.biyan.mê) Kamêra. |
| **Kamêran** | (hn.çewa,n.x.n) 1. Xweşî. Tenayî. Werar. 2. Navê xortane. |
| **Kamêranî** | (n.dar.mê) Tenayî. Xweşî. Serkevtin. :HÎvîya jiyaneka pir kamênî ji bo we di xwazîn. |

| | |
|---|---|
| **Kamîran** | (hn,n.x.nêr) Kamêran. |
| **Kan** | (n.x.mê) Çalik. Kûrik. Kend. |
| **Kanay** | (n.I.mê) Çala avê. Kanî. |
| **Kanê** | (pêrb) rêzman Alavê pisyarkirinê ye.: Kanê birayê te, ne diyare?. Ka. |
| **Kangeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê çal ko av lê kom di be.Kanîya avê. |
| **Kanî** | (n.x.mê) Ciheke av lê di zêt û di pengit. Çavika avê. |
| **Kanîbiharîk** | (n.l.mê) Kanîyên li biharê di zên û havînan çik di bin. |
| **Kanîgulan** | (n.I.mê) Kanîyên di nav mêrg û gulan da. |
| **Kanîk** | (n.dar.mê) rêzman Naznav yan navê biçûkkirî ya kanîyê.Kanîya biçûk. |
| **Kanîmasê** | (hk.cih.cugr,n.I.mê) Bajarkeke li Kurdistana Iraqê devera Amêdîyê. |
| **Kanîmasî** | (n.I.mê) 1.Kanîya pir ji masîyan. Gera masîyan.2. Tişt yan xelkê Kanîmasê. |
| **Kanîn** | 1.(hk.dem.n.mê) Mehên zivistanê. Kanûn. |
| **Kanîn** | 2 (k.jn.x.mê) (Khanîn) bn: Karîn. :Ez di kanim bi bêjim. |
| **Kanînabiçîk** | (êkê) (hk.dem,n.I.mê) Meheka salê ye, [ya kurdî ku 31 rojin û ji 15 î meha 12 ta 15 meha êk ya zayînî]. Pend :Kanîna biçîk, befir hat pîçik pîçik, bi erdî ve bo nîsik. |
| **Kanînamezin** | (duwê) (hk.dem,n.I..mê) Meha duwazde.[ya kurdî 31 rojin ji 14 î meha êk ta 14 î meha du ya zayînî]. Pend :Befira kanîna mezin bi erdî ve di bit asin, di qerisit di bestit. Pend : Kanîna mezin, befir hat rumbejin, wesa çû, te di go agirê li bin.;ang befira vê mehê zû di helit. Pend :Hejdeyî kanînê rojê berê xwe da havînê. Pend :Hejdeyî kanînê rojeke ji rojên havînê. Ang; seqa pîçek gerim di bit. |
| **Kanûn** | (hk.dem) Meha kanîn.:Meha diwazdehê ya sal zayîn. |
| **Kapot** | (n.x.nêr) Sako. |
| **Kar** | 1 (n.x.nêr) Şol. Îş. :Niha karê çiye?. Pend :Karê berwextî, mîna paşayê ser textî. |
| **Kar** | 2 (n.x.dz) khar Têjika bizinê.: Karika li ber makê. :Kar û berx. Pend :Karê guhê berxî di xwar, her wê bi xwe di kir hewar. |
| **Karanîn** | (k.jn.l.mê) Kar pê kirin. Bi karînan. (K) bn: Anîn. |
| **Karbend** | (n.dar.mê) Karê ko mirov di ke.Pîşe. |
| **Karberdan** | 1 (k.jn.I.mê) kharberdan Kar ji kotan ii govan derêxistin çûlî jibo çerandinê. :Zarokan karikên xwe berdan çûlê. (K) bn: Berdan. |
| **Karberdan** | 2 (k.jn.I.mê) Karê xwe biçî hêlan. Xwejikarkêşan. Paş pêncê êvarî em karê xwe di berdin di çin mal. :Berpirsê wan karberdana xwe da. (K) bn: Berdan. |
| **Karbidest** | (kara.I.dz) 1.Xwedîyê-ya karî. Kardêr. 2. Berpirs. : Karbidestên hukmetê. |
| **Karbon** | (n.biyan.mê) Rejî. Kaxeza rengder. |
| **Karcik** | (n.x.mê) Corekê hirmîyane. Girsik. |
| **Kardan** | (k.jn.I.mê) Bersiva hember her pestanek yan hêzekê ye. :Karvedan . Berdij. :Her karekî kardan heye.(K) bn: Ban. |
| **Karder** | (karn.dar.dz) Xudanê karî. Kesê karî di det. Rêvebirê kargeh yan cihî. |
| **Kardo** | (n.x.nêr) Navek kurdî ê peyaya ne. |
| **Kardoxî** | (n.x) dîrokî Kevne babkalkên kurdane. |

| | |
|---|---|
| **Kareba** | (n.x.mê) Têhineke bi hêza av, ba, sotin û htd kar di ket jibo ronahî, gerimkirin, karkirina amêran û htd di nav mal ii dezgehan da. |
| **Karekar** | (n.l.mê) deng Dengûdor. Pitpit. Çîpçîp. Qareqar. |
| **Karesat** | (n.x.mê) bn: Çam. |
| **Karêj** | (n.dar.mê) zinderwar Gehên herdu alîyên ser û binê lama devê mirov û candaran. |
| **Karêz** | (hk.cih,n.x.mê) 1.Coyeka kûr û mezine,li rexên zevî û bîstanan çê di kin, dako ji avê ziha bibin û mita yan şînkatî nerizit. Xendek. 2. Rêyê li bin erdî, çiyan. Tonel. |
| **Karg** | (n.x.mê) Kivark. |
| **Kargeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cîhê kar lê tê kirin. Mekîna diristkirina tiştî. :Kargeha doşavê, cilikan, htd. Fabrîqe. |
| **Kargêr** | (kara.dar.dz) Endamên dezgehan. Bi rêvebirên dezgehan. |
| **Kargir** | (kara.dar.dz) Kesê karî werdigirit. Karker. |
| **Karguzarî** | (hk.dar.çewa) Civakî. |
| **Karhatî** | (hk.l.çewa) Hejî. bi Kêrhatî. |
| **Karik** | (n.x.mê) Kara biçûk. |
| **Karî** | (n.x.mê) giya Giyayeke belg, pane, keske li biharan li çiya û zevîyan hişîn di bit, bi kelandin û lênanê, xwarineka xweş jê dirist di kin, bi xavî nahêt xwarin. : Karî ya kelê. |
| **Karîkatûr** | (nbiyan) Derbirînek honerîye bi mînakên nemaze jibo nirxandina kar,kiryaran û bûyeran bi awayekê dilveker û kenî. |
| **Karîn** | (k.jn. x. mê) 1.Şiyan. : Ez di karim bêjim. 2. Navê keçane. (K) bdn: ez di karim em di karîn, tu di karî hûn di karin, ew di kare[..it] ewan di karin. Pr: dê bi+ bdn. Bdb: di karîm, di karî, di karîn. Db,dûr: karîbû, . . .bûn. (F): bi kare, bi karin |
| **Karînan** | (k.jn. l. mê) Karanîn. :Tu di karî evro qelemê min bi kar bînî .(K) bn: Înan. |
| **Karînayî** | (hk I.çewa) Hatî ye bi karînan. Destê duwê. Kelûpelên kevin yên hatîn bi karanîn. |
| **Karîte** | (n.x.nêr) Garîte.Pend :Karîte liser dîwaran di rawestin. |
| **Karker** | (kara.dar.dz)Miravê kar di ke.Kesê li kargehan kar di ke.Karmend. |
| **karketin** | 1 (k.jn.I.mê) 1. Karkevtin.:Ji karakevtin; Tirombêl ji karketin. ango; êdî bi kêr karî nahêt. 2. Bi karkevtin.ango kar jêra peyda bûn.Dest bi kar kirin. |
| **Karketin** | 2 (k.jn.I.mê) Çandin(dar,darmêw, gundor, û htd) ji karketin.ang; Gelek qelew bûn. |
| **Karkinar** | (hk.I.çewa) Dema xizmeta mirovî ya karî paş çendîn salan di dawî di hêt û bi navsal ve di çe, yan ji egera bûyer û nexweşîyê mirov êdî kar nake, le mehyanekê di wergire. Kamişîn. |
| **Karkinarbûn** | (k.jn.gl. mê) Dema mirov ji karî di raweste û mafê karkinarîyê hebe.(K) bn:Bûn. |
| **Karkinarkirin** | (k.jn.gl.mê) Dema mirov di hêt karkinarkirin. Kamişîn di be.(K) bn: Kirin. |
| **Karkirin** | (k.jn.l.mê) Şolkirin. Şixulîn. :Ez kar di kem. :Kar bi ke. Çima tu kar nakî?.(K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Karmend** | (hk..dar.dz) Karker. Fermanber. :Karmendê radyo, Tv, kargeh û htd. |
| **Karmendî** | (n.dar.mê) Pîşe. Karbendî. |
| **Karname** | (n.l.mê) Danana nexşeyên her projekî berî encamdana wî. Proje. Nexşe. |
| **Karniyar** | (kar,n.dar.dz) Kesekê pispore, çend pirsan ji mirovî di ket herwesa bawemame û şiyanên mirovî di nirxîne, jibo mirovî liser karekî bipejirîne. |
| **Karniyarî** | (kam.dar.mê) Helsengandin jibo wergirtina mirovî bo karî. |
| **Karniyarîkirin** | (k.jn.gl.mê) Hevpeyvîn û nirxandin li bareyî karîna mirovê di xwaze karekî bi ke. (K) bn: Kirin. |
| **Karok** | (n.x.mê) Kivark. Kulavoşk. |
| **Karpêk** | (n.dar.mê) Berhem. |
| **Karsaz** | (kam.dar.dz) Xwedîyê kar. Karder. |
| **Karsazî** | (kara.dar.mê) Cihê karî. |
| **Kartîk** | (n.x.nêr) Hesinekê zivir e jibo hisan û hilûkirina kêr, das, sator û htd bi kar di hêt. Mivred. :Bi kartîkî sator seqa kir. |
| **Kartîx** | (n.x.nêr) Kartîk. :Kartîxekî li kêrikê bi de da xweş bi bît. |
| **Kartol** | (n.x.mê) Pitat. |
| **Karton** | (n.x.mê) 1. Miqawe. 2. Filmên karton. |
| **Karûbar** | (n.dar.nêr) Karê rojane.:Karûbarê îro bi dawî hat. |
| **Karûbarkirin** | (k.jn.gl.mê) Karkirin. Xwe berhevkirin. : Emê . karûbarê cejin ê di kin. :Em dê bi xwe karûbarê xwe bi keyn. (K) bn: Kirin. |
| **Karvan** | (kara.dar.dz) 1. Karker. Xudanê karî.2. Navek kurdî ê kurane. |
| **Karwan** | ( hn,n.x.dz) 1.Bireka dewarên barkirî bi hevra mirov jibo karên bazirganî bi kar di hînin. Bireka tirobêlan.. 2. Navê kurane. |
| **Karwanî** | (kam.dar.dz) Mirovê karwanan di ke. |
| **Karwankirin** | (k.jn.l.mê) Mirov bi dewaran mitayî jibo mal yan firotinê ji cihekî bo yê din di veguhêze. (K) bn: Kirin. |
| **Karwankuj** | (n.l.mê) Stêreke li spêdeyan li elindê xuya di be. |
| **Karxane** | (hk.cih,n.I.mê) Kargeh. |
| **Karzan** | (hk,hn.dar.çewa) 1. Mirovê şareza di karî da.2. Navê mêrane. |
| **Karzanî** | (kam.I.mê) Şarezayî di karî da. |
| **Kase** | (n.x.mê) Peyale. :Kaseya çayê dana ber mêvanan. :Kase şikest. |
| **Kasik** | (n.x.mê) Sênîka biçûk ya li bin peyala çayê di danin.Binkask.Sênîk. :Kasika peyalê ya rengîne. : Çayê di kasikê de sar bi ke û bi de zarokî. |
| **Kaşêt** | (n.cîh.mê) Peyveka navneteweyî ye.bekereya tomarkerê(tîpê). :Kasêta nû ya Şivan Perwer li bazarî heye. |
| **Kaş** | (hk.cih,n.x.mê) Tat. Beten. Evrazî. |
| **Kaşan** | (n.x.mê) Bizmarên darî. |
| **Kaşane** | (n.x.mê) Koçik. Sera. Ville. |
| **Kaşî** | (n.x.mê) Helaneke gogirandî û xemlandîye li binê xanîya dadnin jibo ciwanîyê. |
| **Kaşîkirin** | (k.jn.I.mê) Xemilandin bi helanên kaşî. :Roja xwe kaşî di ke. :Me termeyê mala xwe kaşî kir. (K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Kaşkirin** | (k.jn.I.mê) Rastkirin. Hilûkirin.(K) bn: Kirin. |
| **Kaşo** | (n x.nêr) Dareke serê wî bi girêye jibo hajotina dewar û kewalan yan yarîyan bi kar di hêt. Doqiçik. |
| **Kaşoyanê** | (n.dar.mê) yan Lîztineka kurdewarî ye, mirov xwe liser du desteyan (bir) parve di kin, her yekî kaşoyek di destî daye di kevin dû tepikekê jibo ko bi havêjin gola yan tora berdijê xwe. |
| **Kat** | (n.d.nêr) Dem. |
| **Katjimêr** | (n.I.mê) Demhijmêr. |
| **Kayan** | (n.x.mê) bn: Kovan. |
| **Kavanbar** | (hn.dar.çewa) bn: Kovandar. :Jina kavandar, mêrê kavandar. |
| **Kavil** | (hn.x.çewa)Wêran.Xirab.Heriftî. :Gundê kavil . Maleka kavil. |
| **Kavilbûn** | (k.jn.I.mê) Wêranbûn.Heriftin. :Gundê me ji mêje kavil bûye.: Mala dujminî kavil bi be. (K) bn:Bûn. |
| **Kavilkirin** | (k.jn.l.mê) Wêrankirin. Herifandin. : Dujminan gundê me kavil kir. (K) bn: Kirin. |
| **Kavir** | (n.x.dz) Berxê êksalî.:Kavir berdan ser alîkê.:Kavirê xwe bo mêvanan serjêkir. |
| **Kavlegund** | (n.I.mê) Gundê kavil. Gundê wêrana. Bi nêre wê he gavlegundeke!. |
| **Kawa** | (n.x.nêr) 1. Qehremanê kurd yê evsaneyî , ko ejdehak kuştî û gelê kurd ji sitemê rizgar kirî li 21 adara hersal bîranîna Newrozê cejna rizgarî û sersala kurdane . 2. Navê mêrane. |
| **Kawanî** | (n.x.dz) tewal Sivandok. Sivyank. |
| **Kawdan** | (n.x.mê) Rewş. Biyav. : Eger kawdan ber bi çakîyê ve çûn em dê serdedana derve bi kin. |
| **Kawêj** | (n.x.mê) Vecûn. .Benîşt.Qaçik. : Kawêjê bizinî di devê wêda ye. |
| **Kawêikirin** | (k.jn.I.mê) Vecûn. :Benîştê xwe kawêj di kir waneya xwe di nivîsî.(K) bn: Kirin. |
| **Kawîs** | (n.x.nêr) Gapîsk. |
| **Kaxez** | (n.x.mê) Parçe peroyeka tenike, sipîye hin caran rengîne, ji dar yan pembo çêkirîye, jibo nivîsînê mifa jê di hêt wegirtin. |
| **Kaxik** | (n.x.nêr) Qafik. |
| **Kayîn** | (k.in.x.mê) Vecûn.Vecwîn. :Xwarina çir, benîşt kayîn. (K) bdn:ez di kayêm em di kayên, tu di kayêy hûn di kayên, ew di kayê ewan di kayên. Pr: dê bi +bedn. Bdb : di kayî, di kayîn. Db,dûr : kayîbû, kayîbûn. (F) : bi kayê, bi kayên. |
| **Kebab** | (n.x.mê) zad Goştekê hûrkirî û têkel digel hende xwarinên dî wek pîvaz, sîr, karî, htd bi şîşan vedikin û liser agirî di hêt biraştin. |
| **Kebanî** | (n.x.mê) bn:Kavanî. |
| **Keç 1** | (n.x.mê) 1. Jina şûnekirî. Mêrnekirî. Kheç. 2. Dot. : Peyman keça mamê Arazî ye. |
| **Keç 2** | (hn.x.çewa) Xwar. Nerast. :Axivtina keç. :Ev Xanîye yê keçe !. |

| | |
|---|---|
| **Keçel** | (hn.x.çewa) Mirovê pora wî weryayî ji egera gemar(pîs) bûnê yan nivşî. lêkînan :Keçelo tikve tikve, mêşa mezin çû nik ve.ang ; gotineke jiber gemarîya serên keçelan di bêjin. Hewês. |
| **Keçelî** | (n.dar.mê) Weryana pora serê mirovî. |
| **Keçelok 1** | (n.dar.dz) tewal Core balindeyekê goştxore, serê wî yê bê pere jiber ko bixe nav kelexên candaran. Teyrê nêçîrê. Elho. |
| **Keçelok 2** | (n.x.mê) Xwarineke , ji birinc û nîsik yên bi hevra kelandîn pêkahatî. Pelavnîsik. :Firavîna şivanî keçeloke. |
| **Keçê** | (hd,gazn.dar.mê) rêzman Naznav û bangkirina keçikane. |
| **Keçhêlî** | (n.l.mê) Zirkeç. Zirkiç. |
| **Keçik** | (n.dar.mê) Keç. Kiçik. |
| **KeçÎ 1** | (n.dar.mê) Xwarî. Nerastî. |
| **KeçÎ 2** | (hk.dar.çewa) Kheçî. Qunaxa hêj mêrne kirina keçan. Keçînî. |
| **Keçînî** | (hk.dar.çewa) kheçî Keçî. |
| **Keçkirin** | (k.jn.l.mê) Armanc negirtin. Xarçûn. . Babê min tivengek dana kêlê, lê keç kir , birex ket. (K) bn: Kirin |
| **Keçxapînok** | (hk.I.çewa) Kesê bi gotinên xweş û nazik keçan di xapîne. |
| **Ked** | (n.x.mê) Berhemê renca mirovî. Kar. Paleyî. Bizav.Renc. |
| **Keder** | (n.x.mê, n.nêr) 1. Mêlak. Cerg. Kezeb. Kovan. Keser.2.Navê zelamane. |
| **Kedî** | (hk.x.çewa) Kehî. |
| **Kedîbûn** | (k.jn.l.mê) Kehîbûn.(K) bn : Bûn. |
| **Kedîk** | (n.x.dz) tewal Core çûçikeke(tewal) li deştan heye. |
| **Kedîkirin** | (k.jn.I.mê) Kehîkirin. (K) bn :Kirin. |
| **Kedîn** | (n.x.nêr) Cerê avê.:Zerîyê kedîn danî ser milê xwe û çû ser kanîyê |
| **Kedkar** | (kam.dar.dz) Karker. Rêncber. |
| **Kedûn** | (n.x.nêr) Kedîn. :Kedûn di rêya avê da şikiya. |
| **Kedxwar** | (n.l.dz) Kesê keda destê hejaran jê distînit û dixwet Sitemkar. Derebeg. :Kedxwaran kedê destê hejaran di di xwen. |
| **Kedxwarin** | (k.jn.l.mê) Dema mirovek yan rijêmek berê renca xlikî di xwe. (K) bn : Xwarin. |
| **Kedxwarî** | (hk.I.çewa) Jina bindestê kedxwar û derebegan. |
| **Kef** | (n.x.mê) 1Gîrheka sipî ye ku ji şilqana ava têkel digel madeyên din peyda dibit. Kefa şîr, kefa sabûn, htd. 2. Cihê çemayî yê gopalî ê ku mirov di destê xwe di gire. Kefa gopalî.3. Panka destî. |
| **Kefç** | (kn.x.çewa) Mirovê difina wî serevraz. :Kurkekê kefç. Jineka kefç. Bizin a kefç. |
| **Kefçê** | (hd,gazn.dar.mê) Naznav yan bangkirina jina kefç. |
| **Kefçik** | (n.x.nêr) Kaçik. |
| **Kefçikdan** | (n.I.mê) Amanê têda parztina kefçikan. |
| **KefçÎ** | (n.x.nêr) Kefçik. |
| **Kefçîdank** | (n.dar.mê) Kefçikdan. |
| **Kefço** | (hd,gaz,n.dar.nêr) Naznav yan bangkirina mêrê kefç. |

| | |
|---|---|
| **Kefdan** | (k.jn.l.mê) Dema tişt kefê didin. :Sabûn kefê dide. :Min destêd xwe bi sabûnê kefdan û av nema. (K) bn : Dan. |
| **Kefen** | (n.x.nêr) Kifin. Sindirîk. |
| **Kefgirtin** | (k.jn.I.mê) Bi kef kevtin. Kef jê peyda di be. |
| **Kefgîr** | (n.l.mê) Kefçikek mezine jibo jêgirtina kefê ji xwarinê bikar dihînin. |
| **Kefîk** | (n.x.mê) Parçe perokeke jibo mialîna dest û rûyan. Destmal.Mendîl. |
| **Kefkirin** | (k.jn.I.mê) Kefgirtin. Kefdan. :Ev şampoye kefê nakit, diyare ne ji corên başe!. |
| **Keftar** | (n.x.dz) cardar Heftiyar.:Keftar giyanewerekê dirindeye. |
| **Keftin** | (k.jn.x.mê) Tiştê yan kesê ji cihek bilind bihêt xwarê, yan ji cihê xwe bikevit. Kevtin. |
| **Kefteleft** | (n.dar.mê) Keftûleft. |
| **Keftûleft** | (n.dar.mê) Bizavek mezin jibo peydakirina parîyê jiyanê. |
| **Keftûleftkirin** | (k.jn.gl.mê) Bizîvîn. Xebatkirin. Lezkirin. :Kar nîne, belê ez yê keftûleftekê dikem. (K) bn: Kirin. |
| **Kefxo** | (n.x.dz) Mezinê gund. Kwîxe. Seregund. |
| **Kefxwê** | (n.x.dz) Kefxo. |
| **Kefzer** | (n.dar.mê) giya Kevz. :KEfzerê gera avê ya girtî. |
| **Kevz** | (n.x.mê) giya Giyayek keske di avan da û li ser beran hişîn dibe. |
| **Kehêl** | (hk,hn.x.çewa) 1. Dewarê sivik û peyt jibo siyarbûn û barî. Seklawî.2. Jina ciwan û peyt. |
| **Kehî** | (hk.x. çewa) Giyandarê malî. Giyandarê ne kûvî. :Kewê kehî. : Kotira kehî. Br xKûvî. |
| **Kehîbûn** | (k.jn.I.mê) Dema giyandarê kûvî hînî jiyana di gel mirovan di be.: Ev zaroye yê kehî bûy. ;ang êdî şerim nake di gel di hête nav civatan di kene, di axive. (K) bn: bûn. |
| **Kehîkirin** | (k.jn.l.mê) Weke mirov giyarekî kehî bi ke. : Serbestî du kew di mal da kehî kirin.(K) bn: Kirin. |
| **Kehnî** | (n x.mê) Kanî.: Kehnî derbûn. |
| **Kehrik** | (n .x.mê) Karik. |
| **Kej** | (hk,hn.x.çewa) Keç yan xortê porzer.Rengê ciwan û veboyî. Zer. Pora kej, pora zer. Mazîya kej. |
| **Kejal** | (hn.l.çewa) 1.Keça por û rû kej,zer. 2. Navê keçane. |
| **Kejê** | (hd,gazn.dar.mê) Naznav yan navê bankirina keça kej. |
| **Kejî** | (n.x.mê) Kezî. |
| **Kejo** | (hd,gazn.dar.nêr) Naznav yan navê bangkirina xortê kej. |
| **Kek** | (n.x.nê) Kak. Bira . Heval . Birader. :Serbest kekê mine. |
| **Keko** | (hd,gazn.dar.nêr) Gazîkirin jibo kek. :Keko eve tuyî?. |
| **Kel 1** | (hk.x.çewa) Gelek gerim. Pir gerim. :Çaya kel. Ava kel. |
| **Kel 2** | (n.x.mê) Dema perîna pez û bizinî yan pezê kûvî.; Dema kela pezkûvîyan e. |
| **Kel 3** | (n.x.mê) Garan. Bireka candaran. :Kela pezkûvîyan li çiyayî di çerin. |

| | |
|---|---|
| **Kel 4** | (hk.cih.x.mê) Avahîn mezin û asê liser gir û çîyan jibo xwe parastin ji dujmin û neyaran, kelhe.:Kela xwînê. :Kela berxwedanê. Pend :Kela jin ava bi ken, çi kes nikarin xirab bi ken. :Kela dimdim. :Kela nêrwe. |
| **Kel 5** | (hk.dem,n.x.mê) Rojeka taybetî ye jibo kelandin û şiiştina cilikan. Balav. |
| **Kelabçe** | (n.x.mê) Du kelabkê bazinîne bi hevre girêdayîne dixin destêd mirovê bergoman jibo nikarit çi bizavan biket.Kelamçe. Destvank. |
| **Kelabe** | (n.x.nêr) Darik yan didankên hilawîstina cilikan. Sing. |
| **Kelagirî** | (n.dar.mê) Kizgirîk. :Kelagirî di singî da ma. |
| **Kelandin** | (k.jn.x.mê) Zadlênan. Lênana xwarinê. Gerimkirina xwarinê di nav avê da,ta bi kêr xwarinê bihêt. (K) bdn: ez di kelînim, em di kelînîn, tu di kelînî hûn di kelînin, ew di kelîne[..it]ewan di kelînin.pr: dê [bi +] bdn. Bdb: di keland, di kelandin. Db,dûr: kalandibû, bûn. (F): bi kelîne bi kelînin. |
| **Kelandî** | (hk.dar.çewa) Zadê lênay. Xwarina berhev. :Zadê zêde kelandî bê tame. |
| **Kelar** | (hk.cih,cugirn.x.mê) Şarek Kurdistana Iraqê ye. |
| **Kelaş** | (n.x.mê) Corek pêlavên kurdî ye ji bendikan çê dikin. Kelaşên Silêmanîyê binavdengin. |
| **Kelaştin** | (k.jn.x.mê) Çêkirina coyekê li erdî. Kelaştina leşî; Şeqkirin. Çeliqandin. Co di erdekî ve kirin. :Berazan erdê kelaştîn. (K) bdn :ez di kelêşim em di kelêşîn, tu di kelêşî hûn di kelêşin, ew di kelêşe[...it] ewan di kelêşin. Pr:dê bi+bdn. Bdb: di kelaşt, di kelaştin. Db,dûr: kelaştibû, kelaştibûn. (F):bi kelêşe, bi kelêşin. |
| **Kelaştî** | (hk..dar.çewa) Cihê ko hatîye kelaştin. :Birîna kelaştî. |
| **Kelat** | (hk.cih.x. çewa) Cihê asê. Rik. Zirî. |
| **Kelax** | (n.x.nêr) Kelex. Mirar. |
| **Kelbetan** | (n.dar.nêr) Kêlbetan. |
| **Keldan** | (k.jn.I.mê) Kelandin. |
| **Kele** | (hk.x.çewa) Gelek. Pir. Mezin. Kele dirêj. |
| **Keleba** | (n.x.nêr) Kirosk. Dîkil. |
| **Kelebang** | (n.dar.nêr) Keleba. Dîkil.Kirosk. Xirosk. |
| **Kelebçe** | (n.x.mê) Kelabçe. |
| **Kelebçekirin** | (k.jn.l.mê) Dema destên kesekî bi kelebçê girê didin(k) bn: Kirin. |
| **Kelebçekirî** | (hk.I.çewa) Kesê destên wî bi kelebçê girêday. |
| **Keledirêj** | (hn.dar.dz) Mirovê gelek dirêj. Roqdirêj. |
| **Kelegirî** | (n.l.mê) Kizgiryok. Kizgirîk. :Kelegirî ya keftî hinavên we. |
| **Kelegurî** | (hn.dar.dz) Mirov yan candarê gemar. Mirovê gurî Mirovê pîs. |
| **Kelek 1** | (n.x.mê) khelek Komeka beran liser êk. Kelûk. Komeka keviran h ser hev. |
| **KeleK 2** | (n.x.mê) Gemî. Belem. :Bi kelekê li ava çemî derbaz di bin. |
| **Kelekvan** | (kam.dar.dz) Xwedîyê kelekê, yan kesê kelekê di hajot Gemîvan. Pend :Bi kevî nav pêlên avê yan liser çokên kelekvanî rûne ?. ang; bi serbihndî bi mire,yan bi serşorî bijî. |
| **Kelem 1** | (n.x.nêr) khelem 1. Darekê sertîj yan stirîyek tîj. Pend:Kelemê çavê neyaran. Ang; jibo mirovê mêrçak di hêt gotir.2. Qelem. Xame. |

| | |
|---|---|
| **Kelem 2** | (n.x.mê) giya khelem Kelemî. |
| **Kelemêş** | (n.dar.mê) Mêş. Mêşa mezin. Kermoz. |
| **Kelemî** | (n.x.mê)giya hişînkatî.Core riwekeke(giya) belgên wê têkpêçayîne, şêweyê girovir werdigirin, bo îprax û xwarinên din bi mifa jê di hê wergirtin. |
| **Kelemîz** | (hk.dar.çewa) Mirovê gelek di mîze. Pirmîz. |
| **Kelemsor** | (n.I.mê) giya çandin Corekê kelemî ye rengê wê sore. |
| **Kelendûr** | (n.x.mê) giya çandin Giyayekê keske, bi stirîye, gula wê ya more, rihên wê di gel xwarina avikan, zerkirî yan xav di xon. Xelendûr. |
| **Kelepçe** | (n.x.mê) Kelebçe. |
| **Kelerim** | (n.x.mê) giya Gulkelem. |
| **Kelestûn** | (n.dar.mê) Keskesor. Heftreng. |
| **Keleş** | (hn.x.çewa) 1. Mêçak. Zîrek. 2. Rind. Ciwan. |
| **Keleşêr** | (nl.nêr) Dîk. Dîkil. Kirosk.Kelebang. |
| **Kelex** | (n.x.nêr) Laş (leş) ê giyandar yan mirovê mirî. Terim. Mirar.:Kelexê gurî. Kelexê bizinê. Kelexê kotirê. |
| **Kelexbûn** | (k.jn.I.mê) Dema candarek dirêj di be, çi mirin, nexweşî yan mîna mirîyan li xwe di ke.:Segê me yê bûye kelex. :Zelamekê li bin darê bûye kekex. |
| **Kelexkirin** | (k.jn.l.mê) Dema candar yan mirov mîna kelexê mirî ra di keve.: Ka rebe eve çiye te wesa xwe kirî kelex?. |
| **Kelê** | (hn.x.çewa) Xwarina bêxwê. Xwarin kêmxwê. Bêxwê. |
| **Kelêjî** | (n.x.mê) can Şûn kilikeke(kurî) di keve dawîya zîvka pîşta mirovî. |
| **Kelêjîgirtin** | (k.jn.I.mê) Nojdarên gelêrî, kelêjîya mirovê kelêjîya wî keftî bi rêya rakirin û perixandina kelêjîyê nexweşî çare di kin. |
| **Kelêjîkevtin** | (k.jn.I.mê) Di kurdewarî da core derdeke kelêjî ya mirovî ji cih di çit. |
| **Kelêjîrakirin** | (k.jn.gl.mê) Kelêjîgirtin. |
| **Kelhorî** | (n.x.mê) Devokeka taybete, ya devereka rojhilata Kurdistanê. |
| **Kelêkovî** | (n.l.dn) candar Nêrî û bizinên kûvî. |
| **Kelik** | (n.dar.mê) Xanîk. Kelek. |
| **Kelistin** | (k.jn.dar.mê) Hicmetîbûn. (K) ez di kelizim , tu bi kelize, hû dê bi kelizin... . |
| **Keliztin** | (k.jn.x.mê) bn :Kelistin. |
| **Kelişandin** | (k.jn.dar.mê) Derz lê kirin. Kelaştin. (K) bdn: ez di kelişînim em di kelişînîn, tu di kelişînî hûn di kelişînin, ew di kelişîne[...it] ewan di kelişînin.Pr :dê bi+bdn. Bdb: di kelişand, di kelişandin. Db,dûr:kelişandibû, kelişandibûn.(F) :bi kelişîne, bi kelişînin. |
| **Kelişîn** | (k.jn.x.mê) Peqîn. Derzîn. : Erd ji bê baranî yê keliştî. |
| **Kelişte** | (hk.cih,n.x.mê) Cihek , erd yan dîwarek derzên mezin bi kevinê. Peq. Derz. |
| **Keliştin** | (k.jn.x.mê) Kelişîn. |
| **Kelî** | (hk.x.çewa) bn: Kelê. |
| **Kelîn** | (k.jn.x.mê) Kelîna av yan xwarinê. :Xwarin kelî. :Av di kele. :Mirov ji german di ke. (K) bdn: ez di kelim em di kelîn, tu di kelî hûn di kelin, ew di kele[...it] ewan di kelin. Pr :dê[bi] +bdn. Bdb : ez di kelîm em di kelîn, tu di kelî, hûn di |

| | |
|---|---|
| | kelîn, ew di kelî ewan di kelîn. Db,dûr: ez kelîbûn em kelîbûyn, tu kelîbûy hûn kelîbûn, ew kelîbû, ewan kelîbûn[bi bûn]. (F) : bi kele, bi kelin. |
| **Kelk** | (n.x) Mifa. Pare. |
| **Kelle** | (n.x.nêr) candar Kuloxê serê mirov û giyandaran. |
| **Kellereq** | (hn.I.çewa) Mirovê serreq yê ji êka xwe nehêt xwarê. Riko. |
| **Kelojtin** | (k.jn.x.mê) Dema mirov bi didanan tovik keskan û htd di şikênit û kakilan di hîne der û di xot. Pend : Çêl dotin û kezwan[keskan] kelotin.ang; dema êk du karên jihev cuda û seyr di yek dem da di ke.(K) bdn: ez di kelojim em di kelojîn, tu di kelojî hûn di kelojin, ew di keloje[...it] ewan di kelojin. Pr:dêbi+bdn. Bdb : di kelojt, di kelojtin. Db,dûr : kelojtibû, kelojtibûn. (F) : bi keloje, kelojin. |
| **Kelotin** | (k.jn.x.mê) bn :Kelotjtin. |
| **Kelpik** | (n.x.nêr) Qelpik. Tîvkil.: Kelpikê tuivka gulberojê. :KeIpikê berîmaskê. |
| **Kelpîç** | (n.x.mê) Libin ên ji axa taybet dirist di kin jibo avahîyan. Bilok. |
| **Kelûpel** | (n.dar.pir) Tişt. PertaI.:Kelûpelêd nav malê. :Kelûpelên xwarinê. |
| **Kelwaş** | (n.x.nêr) Kelexê mezin. Leşê gir. Kelexê qebe. |
| **Kelwaşdar** | (rd.dar.çewa) Mirovê bi kelwaş. :Kesekê kelwaşdare. anko; kelex mezine .Zepzepe. |
| **Kem 1** | (hn.çend) Kêm. Pîçek. |
| **Kem 2** | (hn.x.çewa) khem Mirov yan giyandarê lêva wî xwar yan kelişî. |
| **Keman** | (n.x.mê) mûzîk Kemançe. |
| **Kemançe** | (n.x.mê) mûzîk Core amêrekê mûzîkê ye. |
| **Kemançejen** | (pîşn.I.dz) Kesê amêrê kemanê lê dixe. Lêderê-ra kemanê. |
| **Kemançevan** | (pîşn.dar.dz) Kemançejen. |
| **Kemax** | (n.x.mê) leş Cihê di kevit navbera tenişt û ranan.Ciwanîya bejinê ji kamaxane,nemaze li cem jinan. Pend :Keçeka kemax kêrîşke.ang; kemaxêd wê weke yêd kêvrûşkan di rindikin. |
| **Kembax** | (hn.x.çewa) Kavil. Wêran. Heriftî. Mal kembax, mal wêran. Kambax. |
| **Kember** | (n.x.mê) Kemer. |
| **Kemer** | (n.x.mê) Qayîşa li piştê di bestin(girê di din). Kemera zêrî. |
| **Kemê** | (gazn.dar.mê) Naznav yan gazînavê jina kem. |
| **Kemo** | (hd,gazn.dar.nêr) Mêrê kem.Gazîkirina zelamê lêvkem. |
| **Kemole** | (n.x.mê) Betilkek şûşe, dar yan like, girovire, yan xarûvîçe derê wî tenge, şileyan di nav da di parêzin.. |
| **Kemtiyar** | (n.x.dz) candar Heftiyar. |
| **Ken** | (n.x.mê) Kenî. |
| **Kenal** | (n.cîh.mê) l.Co. Cok . :2.Kenalê têlevizyonê. |
| **Kenandin** | (k.jn.mê) Dema êk kenî ya mirovî bi hîne, bi kiryarên lêbokî yan gotinên bi kenî, yan mirov kenîya êkî bînit. Dane kenîn. (K) bdn: ez di kenînim em di kenînîn, tu di kenînî hûn di kenînin, ew di kenîne[...it] ewan di kenînin. PR:dêbi +bdn. Bdb di kenand, di kenandin. Db,dûr: Kenandibû, kenandibûn (F) •bi kenîne, bi kenînin. |

| | |
|---|---|
| **Kenar** | (hk.cih) Rex. Al. Kinar. |
| **Kenarî** | (n.x.mê) dar riraşl.Tiraşeka xemildare, keske, stirîdare 2 Çûçikeka biçûke. |
| **Kend** | (hk.cih..x..mê) Çal. Kûr. Nihal.:Cihê lêkeftina guleya topê kendek ya di erdî da çê bûy. |
| **Kendal** | (n.l.nêr) Tenişta giran ya bi baranê hatîye renîn, xwarin Beten. |
| **Kengaro** | (n.biyan) Giyandarekê şîrdere, ling û kilik dirêje, li Ustralya di jît, têjika xwe di çantikê zikê xwe da xwedî di ke. |
| **Kengê** | (hk.dem) rêzman Kengî. |
| **Kengir** | (n.x.nêr) giya Riwekeke li çolan heşîn di bit û zîxikên wî bi keladin û xavî di hên xwarin. Kering. |
| **Kengiroşk** | (n.dar.mê) Tov, yan danê kengiran. Sisî. |
| **Kengî** | (pêrb) rêzman Alavê pêvegirê pisyarê. :Kengî dê Heval hêf? Kengî tu çoy welatî?. |
| **Kenî** | (n.x.mê) deng Dengê ji devê mirovî derdikevit di gel bişkurîna Serûçavan û caran rondik ji çavan di hên ,dema gotinek yan Bûyerek seyr rû di dit. Pend :Kenî ji dilê xweş di hêt, baran ji evrê reş di hêt. |
| **Kenîn** | (k.jn.x.mê) Wekî mirov bi yekî, kirayakê yan gotineka seyr bi bîme yan bi bihîze,kenîya mirov di hêt. (K) bdn : ez di kenim em di kenîn, tu di kenî hûn di kenin, ew di kene[..it] ewan di kenin,. Pr :dê[bi] + bdn. Bdb : ez di kenîm, em ewan, hûn di kenîn, tu,ew di kenî. Db,dûr : ez kenîbûm, em kenîbûyn, tu Kenîbûy, ew kenîbû, ewan, hûn kenîbûn. (F) : bi kene, bi kenin. |
| **Kenkene** | (hn.dar.çewa) Mirovê mezin û zengîn, xwedî mal û sentenet. Berpirs. :Têkelîya wî bi tinê bi kenkenan ra ye !. |
| **Kenok** | (ûk.dar.çewa) Mirovê herdem di kene. Devkenî. Devbeş.Devkenok. :Tu çendê kenokî ?. :Hindî ya kenoke, Mirovî di kenîne !. |
| **Kepen** | (n.x.nêr) Cilekê stûre ji hirîya pezî çêkirîye, ser milan ta di gheit erdî yê dirêje, şivan, berxvan, karikvan,gavan û htd, ji bo xwe parastin ji serma û baranê. di kin ber xwe. |
| **Kepir** | (n.x.mê) Çar yan pitir stûnan bi şêweyê çarkujî yan lakêş di çikilînin dar ti pelexî liser di danin jibo liser yan li bin rûniştin û nivistin yan higirtina mitayî. |
| **Kepî** | (n.x.nêr) can Poz. Difin. |
| **Kepîr** | (n.x.mê) can Pidî. |
| **Kepû** | (n.x.nêr) can Difin. Kepî. Poz. |
| **Ker l** | (n.x.nêr) candar Giyandarek malîye mirov bo veguhaztina mitay bikar di hînin. Guhdirêj. hêmaya mirovê sade û bêmejî. |
| **Mamik** | :Ker zirî, pişkul firî.ang ;teqîna tivengê. Pend :Kero ne mire, ta bihar di xemilit. Pend :\i Kerî siwarbûn şermeke, peyabûn dune. .Pend :Kerê melê û ziyana melê.Pend :her kerê berêye, lê kurtanê nûye.ang ; mirovê tenê bi serve goraye, di dil da her wek berê ye.Pend : Ne di şiya kerî, palî hila.ang ; dema mirovî karek pê çê ne be, xwe bi yekê kêmtir ve xerîk di ke. |
| **Ker 2** | (ûn.x.çewa) kherr Mirov yan giyandarê baş nabihîze. :Ma tuyê kerî te hay ji min nîne ?.Guhgiran. |

| | |
|---|---|
| **Ker 3** | (n.x.nêr) kher Pirt. Parçe. :Kerekê nanî.ang; pirteka nanî. Pend :Kerekê sêvê ji ber vekirî.ang; heger du mirov wek êk bin. |
| **Ker 4** | (n.x.nêr) kher Bira bizinî. Bira Pezî. Kerî.Celeb. :Kerekê pezî berda nav ziyanê. |
| **Kerajjo** | (kam.dar.dz) Kesê liber keran û keran di hajot. Kervan(gavanê keran). |
| **Kerane** | (hk.dar.çewa) Keratî. |
| **Keratî1** | (hk.dar.çewa) Kiyarên sade û bê aqilane mîna keran. kerînî |
| **Keratî 2** | (n.dar.mê) kherratî Nexweşîya kerbûnê. Nebîstin. |
| **Kerax** | (pîşn x.dz) Mirovê zêrevanîya coyên li ser rez û bîstanan parve di bin, di ke dako av bi diristî balav bi bit û bi herwe ne çit. |
| **Keraxî** | (n.dar.mê) Karê keraxan. |
| **kerb** | (n.dar.mê) Kîn. Toreyî. hêrisbûn. Dilreşî. Daxdilî. |
| **Kerbeng** | (n.dar.mê) giya Kerbeşk. |
| **kerbeşk** | (n.dar mê) giya Core giyayek bi sitrîye û di hêt xwarin nexasim nêrik a Wê gelek cor hene ji wan jî, ; kebeşka xwarinê û kerbeşka keran ji ber ko mirov na **xon**, lê xwarinek xweşe jibo dewaran. Jiber hindê wesa hatîye navkirin. |
| **Kerbûn 1** | (k.jn.I.mê) Weke mirovê kiryarên şaş bi ke, mîna keran.Aqisivikbûn. :hidî wêve tire, ew kertir bi de. |
| **Kerbûn 2** | (k.jn.l.mê) kherrbûn Mirov rastî derdê ne bihîstinê di ûêt û egra nexweşî yan pîrûnê. :Jiber dengê topan yê ker bûye |
| **Kerçilandin** | (k.jn.dar.mê) Perçiqandin û têkelkirin. |
| **Kere** | (ûn.x.çewa) Mirovê karker û çespan. Mirovê ketxoda Pend: kereyo xwereyo,nekero,dilkesero,ang:”mirovê rêncber herdem berhemdare û bervajî |
| **Kerefs** | (n.x.mê) Giya(tere)Coreke giyayekê tere bi xavî di gel xwarinan di xon, hin caran di gel zadî di lênin. |
| **Keremkirin** | (k.jn.I.mê) Pêrgînî lê kirin. :Kerem ke .Fermo. :Rêzdarî kerem kir û got ; di vê em .. (K) bn :Kirin. |
| **Kereng** | (n.x.nêr)Kengir. |
| **Kereste** | (n.x.nêr) Kelûpel. Made. |
| **Kergez.** | (n.x.dz) Balinde Elho. |
| **Kerguh** | (n.l.dz) Kêvrîşk.Kêvroşk. |
| **Kerifîn** | (k.in.x.mê) Dema mirovê çavbirsî kirêt zadî di xwe. : Dê here bi kerife |
| **Kerik 1** | (ûn.x.çewa) kherrik Fêqîyê ne gehiştî. : (Bacan, hijîr, sêv û htd) a kerik. :Zerdû gehiştîne?, ne bi xudê hêj kerikin!. |
| **Kerik 2** | (n.dar.mê) *candar* Kerê biçûk. |
| **Kerik 3** | (n.dar.mê) kherik Kerekê biçûk. Pirta piçûk. |
| **Kerixwîn** | (k.jn.x.mê) Gelek mandîbûn. Gelek westan. Bêgêwilbûn. (K) Bdn. :Ez di kerixim, em di kerixîn.tu kerixî, hûn di kerixin, ew di kerixe[..it]. PR:dê bi + bdn . Bdb : ez di kerixîm, em, hûn, ewan di kerixîn, tu di kerixî, ew di kerixî. |

| | |
|---|---|
| | Db,dûr: ez krixîbûm, em kerixîbûyn(bûn), tu kerixîbûy, hûn kerixîbûn, ew kerixîbû, ' wan kerixîbûn.(F): Bi kerixe, bi kerixin. |
| **Kerî 1** | (n.x.mê) kherî Kerê pez û bizinî. |
| **Kerî 2** | (n.dar.mê) *kherrî* Derdê ne bihîstinê.Kerbûn. Guhgiranî. |
| **Kerînî** | (hn.dar.çewa) Karê şaş û bê wic.bê aqilî. Bê mejî.Dînatî |
| **Kerkedan** | (n.x.dn) candar Candarekê mezin û hişkavî ye, di zêt. |
| **Kerkirin 1** | (k.jn.I.mê) Mejî şûştin xapandin ta aqilsivik di be, wek keran. Mîna keran serederî di gel da kirin. |
| **Kerkirin 2** | (k.jn.I.mê)kherkirin Parçekirin. Pirtikandin. Pirtpirtkirin. :Sêv ker kir. :Kutilk ker kir. (K) bn:Kirin. |
| **Kerkirin3** | (k.jn.I.mê) kherkirn 1. Bi dengekê mezin,gurzekî, yan têxebitîna guhan, mirov êkî yan xwe toşî nexweşîya kerbûnê bi ke.2. Mitbûn. Gotina bi dilî nebit xwe ker di ke. (K) bn: Kirin. |
| **Kerkûvî** | (n.dar.dn) Kerê kûvî. Zêbra |
| **Kerkûk** | (ûk.ciû.cugm) Bajêrekê zengîne bi neftê li Kurdistana îraqê.: Kerkûk dilê Kurdistanê ye.; serokê neteweya-kurdî M. Barzanî. |
| **Kerkûkî** | (malb,n) Xelikê Kerkûkê.Azad kerkûkî ye,ang; Azad ji Kerkûkê ye. |
| **Kermêş** | (n.I.mê) candar Mêşeke mezine liser **xwîna dewaran** di jît. Kermoz. |
| **Kermoz** | (n.I.mê) candar Kermêş. |
| **Keroşk** | (n.x.dz) candar Kêvrîşk. |
| **Kersil** | (n.x.mê) Pişkulên dewaran. Zibilê dewaran yê nîvreq û tepik. |
| **Kert** | (n.x.nêr) Pirt. Ker(kûer). |
| **Kertik 1** | (n.dar.nêr) l.Darekê dutaye mîna du guhan di dirêjin binê wî yek taye, çilî yan dirû û hejên bi stirî dixin nav guhan û liser milên xwe di danin. kunork. |
| **Kertik 2** | (n.dar.nêr) Erdê di navbera malikên çandinê, cihê hatin û çûna mirovan. : Pêyên xwe dane ser kertikan da pê li şak û tayên xiyara ne danî. |
| **Kerû** | (n.x.mê) Kîfkû. |
| **Kerûbûn** | (k.jn.I.mê) Kîfkûbûn. : Nan ê kerû bûy. (K) bn :Bûn. |
| **Kerwan** | (n.x.nêr) bn: Karwan. |
| **Kerxane** | (n.dar.mê) Xana keran. Gova keran. |
| **Kerxur** | (ûk.I.çewa) Mirovê herdem (wekî keran) di xwe û têr nabe. Hefhefî. |
| **Kes** | (n.nedyr) Jibo mirovî dema ne dîyer bi kar di hêt. Mirov. Pend :Kesê mino destê mino ; ang divê mirov bi xwe keda xwe bi ke.Pend :Kes nîne pêdivî kesê nebit. Pend :Kes mîna xudanî, nizanit derdê giyanî.ang; xudan bi xwe çakî, neçakî, derd û derman ên xwe di zane, nek kesê dî. |
| **Keser** | (n.x.mê) Kovan:Wexerkirina wî keserk mezin di dilê me da hêla. |
| **Kesk** | ( ûn.x.çewa) reng Rengê giya û darûbaran. :Giyayê kesk. |

| | |
|---|---|
| **Keskan** | (n.dar.mê) dar 1. Dara keskana di dit. 2. Berê dara keskanê, rengê wî kesk û girovire, bi terînî yan paş hişik di be, kakila wî di hêt xwarin û gelek corên derman û sabûnan jê di hên diristkirin. Kezwan. |
| **Keskankiroj** | (n.dar.mê) balinde Çûçikên bi xwarina keskanan navdengin. |
| **Keskanterk** | (n.I.mê) Kezwanterk. |
| **Keskbûn** | (k.jn.I.mê)Demê tiştek rengê kesk di gire. :Li ser giyayî rûnişt şelwalê wî kesk bû. (K) bn:Bûn. |
| **Keskesor** | (n.I.mê) Heftreng. Kelestûn. :Baranê vekir keskesor peydabû. |
| **Keskkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov rengê kesk li cihekî bi de. Pirça xo kesk kir. |
| **Keskûsor** | (n.gl.mê) Keskesor. :Keskûsorê heft reng. |
| **Kesme** | (n.x.mê) Core naneke wek sawik, yan kade dirist di ken bo xwarinê di gel çayê û zadên din. |
| **Keş** | (n.x.mê) Çewayî ya pileyên gerim , ba, baran. Biyav . Seqa. |
| **Keşe** | (kara.nêr) Qeşe. |
| **Keşîs** | ( kara,nêr) Keşe. |
| **Keşîşxane** | (n.dar.mê) Dêra keşan. |
| **Keşk** | (n.x.mê) rêçau Dewê civir di ken tepik û li ser ban û erdan di danin tanî ûişik di bin, jibo gelek corên xwarina bi kar di hînin |
| **Keşkerûn** | (n.I.mê) Xwarineke ji keşkên di nav rûnî da qelandî hatîye çêkirin. :Keşkerûn xwaineka xweşe. |
| **Keşnas** | (pîşn.I.dz) Pisporê warê keşnasî yê. |
| **Keşnasî** | (kara.I.mê) Zanîna pêşbînîna seqayî. |
| **Keşti** | (n.x.mê) Gemî. Papor.:Keştîya deryayî. :Keştîya esmanî. :Keştî ya ceng. :Keştîya Nuh. |
| **Keştîgeh** | (ûk.ciû,n.dar.mê) Cihê rawestana keştîyan. |
| **Keştîyan** | (kar,n.dar.dz) Kesê keşti yê di hajot. Rêvingê keştî yê. |
| **Ketin** | (k.jn.x.mê) bn: Kevtin. |
| **Ketxûda** | (kar,n) l.Mezinê gund.Hêja. Rêncber. Pend :Ketxûda ewe yê çavê wî ne li destê xelkî. |
| **Keval** | (n.x.mê) Wêne(mînak) ên Hunerî .Tablo. Dîmen. :Kevalekê ciwan. :Kevalê govenda kurdî. |
| **Kevan** | (n.x.nêr) Kivan. |
| **Kevaştin** | (k.jn.x.mê) Givaştin. |
| **Kevçî** | (n.x.nêr) Kefçik. |
| **Keyer.** | (hn.x.çewa) Rengên sipî û reş yan rengên dî bi hev ra. Belek. : Enîya kever.ang ; pesina keç yan xortê por reş û dêm sipî. : Bizin a kever.ang ; bizina reş û sipî. |
| **Kevil** | (n.x.nêr) Pîstê lawiran yê hişkirî. |
| **Kevilbûn** | (kj.n.I.mê) Lûçbûn. Kevil di serda çûn. (K) bn : Bûn. |
| **Kevilkirin** | (k.jn.I.mê) Kevilê lawiran pişti vekujtinê di serda di ûînin. (K) bn : Kirîn. |
| **Kevilldrî** | (ûk.I.çewa) Kevil di ser da înaye. :KeIexê gîskê kevilkirî. Bizin a kevilkirî. |

| | |
|---|---|
| **Kevilûjank** | (n.I.nêr) Çarçûve. Kevil.Biyav. |
| **Kevin** | (rd.x.çewa) 1. Giyandarê jîyê wî dirêj û bi salve çûyî. :Ew mirovekê kevine!. 2.Tiştê ne nû. :Xanîyêkê kevin. :Gotineka kevin. Br × Nû |
| **Kevinbûn** | (k.jn.I.mê) Dema candarek temen dirêj di bit, tiştek pir di hêt bi kar anîn rengê wî kirêt di bit. :Cilikêd min yên kevin bûyn. :TirombêIa wî ya kevin di bit. (K) bn: Bûn. |
| **Kevinkirin** | (k.jn.I.mê) Weke mirov tiştekî, (cil, pêlav, tirombêl û htd) bi kar di hînit û kevin di bit. (K) bn: Kirin. |
| **Kevinperêz** | (ûn.I.cewa) Kevneperist. |
| **Kevinûnwî** | (n.I.mê) Cilikên destê duwê. Cilikên kevin. Kincên kevin. |
| **Kevir** | (n.x.nêr) Berên pan û mezin. Helan. Ber. Pend :Kevirê û havînê pavê(bi ûavêje) kadînê.ang; her tiştê mirov bi kare li havînê vecivîne, dako li zivistanê mirov mifa jê bi wergire.2. Navê mêrane.:Ew weke kevirî ye.ang; mîna kevirî (dengvedan) gotina ûemberê xwe dubare di ke. |
| **Kevişte** | (ûk.x.çewa) Mirovê kesatî lewaz. Sade. Kêrnehatî. Kolanî. |
| **Keyî.** | (n.x.mê) 1. Belekên berfê li lat û zinaran li bi har û havînan di mînit.2. Navê keç û mêrane. |
| **Kevjal** | (n.x.dz) Kêvjale. |
| **Kevkanî** | (n.dar.mê) Berdeqanî. |
| **Kevnar** | (hn.dar.çewa) Pir kevin. Gelek kevin. |
| **Kevneperist** | (hk.I.çewa) Kesê hizir û boçûnên kevin li cem .Tiştê  kevin di perêsit. Paşkevtî. Paşvero. |
| **Kevneşop** | (rd.I.çewa) Rewiştên kevin yên gelan. Kevin.tîtal. |
| **Kevneşopî** | (n.I.mê) Kevneşopî (n.I.mê) Kar û tiştêd têkelî bi bi tîtalên kevin ve heye. |
| **Kevnik** | (ûn.dar.çewa) Kevin. |
| **Kevok** | (n.x.mê) balinde Balindeyeka kehî yan kûvî ye li Kurdistanê cîhanê pire. Kotir. |
| **Kevot 1** | (n.x.mê) dar l.Dareke li çiya hişîn di be û şivên wê jibo gopal û destedaran bi kar di hînin. |
| **Kevot 2** | (n.x.dz) balinde Tivîrk. |
| **Kevtin** | (k.jmê) Livîn yan wergerana tenan ji cihê xwe. Fêqî ji darê kevt. Mirov kevtin. Pend : Ji me kevt û bi me kevt.ang; kesê mirov mezin di ke, li dawîyê dijî mirovî ra diweste.(K) bdn: ez di kevim em di kevin, tu di kevî ûûn di kevin, ew di keve[..it] ewan di kevin. Pr : dê bi + bdn. Bdn : di keft[kevt] di kevtin[keftin]. Db,dûr : ez kevtibûm, em kevtibûyn, tu kevtib ûy, ûûn kevtibûn, ew kevtibû, ewan kevtibûn. (F) : bi keve bi kevin. |
| **Kevz** | (n.x.mê) Kefz. |
| **Kew** | (n.x.dz) balinde Balindeke dengxweşe, li çiyayên Kurdistanê mişeye, mêmaya neteweya kurde. Pend :Kew dujminê serê xweye. |
| **Kewal** | (n.x.dz) candar Giyandarên wek pez û bizin. Terş. :Kewal ji govê berdan. |
| **Kewandin** | (k.jn.x.mê) Tişek gerîm yan dermanek dijwar di danî ser cihekê kul yan birîdar da ku çare bi bit. (K): ez dikewînin em dikewînin, tu dikewînî ûûn dikewînin, ew ewan dikewînin. (F): |

| | |
|---|---|
| | bi kewîne bi kewînin |
| **Kewar** | (n.x.mê) Şaneya ûingivê mêşan. |
| **Kewçerîn** | (ûk.dem) Demsaleke di bêjin kew li ber tava ûeyvê di çerin. |
| **Kewçîrk** | (n.dar.dz) Kew. |
| **Kewden** | (ûn.x.çewa) Lewçe. Çivêl.Gewçe. |
| **Kewgîr** | (kara,dar.dz) Nêçîrvanê kewan. |
| **Kewîn** | (k.j.n.x.mê) Hatine kewandin. Birîna wî kewya. Dermankirin. |
| **Kewvan** | (kam.dar.dz) Xudanê kewan. Mirovê kewan xwedî di ke. |
| **Kewsûsk** | (n.l.dz) Sûsik.Sîsk. |
| **Kewtkewt** | (n.dar.mê) deng Dengê rewîna segan. |
| **Kewtkewtkirin** | (k.jn.gl.mê) Rewîn. :Segê cîranî kewtkewt di kir. |
| **Kewitîn** | (k.jn.x.mê) Rewîn.: Dêhil di kewite. |
| **Key 1** | (pêrb) rêzman Alavê pirsînê.Kengî. |
| **Key 2** | (kara.x.dz) Peyveka kevnare ango Paşa. Şa. |
| **Keya** | (kar,n) Kedxûda. Mezinê gund yan hozê. |
| **Keyîn** | (k.jn.x.mê) Şilqandin. : Meşk keyîn. Bi keyê. Di keyêt. |
| **Keyf** | (n.x.mê) Xweşî. Dilxoşî. Bijkurîn. |
| **Keyfkirin** | (k.jn.I.mê) Demên dilveker derbaz kirin. Bi keyf kevtin. Em dê çîn seyranê ji xwe ra tê keyfê bi kin. (K) bn:Kirin. |
| **Keyfxwes** | (hk.I.çewa) Mirovê ûerdem kiryar û gotinên dilveker di ke. Mirovê rûxweş. Mirovê gotin ti pêkenînên xweş di ke. |
| **Keyfxwesî** | (n.I.mê) Çewanî çakî. Keyf û xweşî. |
| **Keyfxwesîkirin** | (k.jn.gl.mê) Silavkirin. Çewanî û çakî di gel ûevdu kirin. ; Noke kabirayekî keyfxweşî di gel min lar, lê ez wî na nasim!. (K) bn:Kirin. |
| **Keyvan** | (n.dar.dz) l.Berpirsa-berpirsê malê. Semyan. Kabanî. |
| **Xatûn.2** | Navê keç û mêrane. |
| **Keywan** | (n.dar.dz) Keyvan. |
| **Kezaxe** | (n.x.mê) Birîna, ûildana darûbarî. bn: kezaxtin. :Çaxê kezaxê ye.Birayê min yê çûye kezaxê. |
| **Kezaxtin** | (k.jn.x.mê) bi kevin û berê wan baştir bi bit. : Mêwa tirî kezaxt. (K) bdn: ez di kezêxim em di kezêxîn, tu di kezêxî hûn di kezêxin, ew di kezêxe[..it] ewan di kezêxin. Pr:dê bi + bdn. Bdb: di kezaxt, di kezaxtin.Db,dûr: kezaxtibû,.... bûn. (F): bi kezêxe, bi kezêxin. |
| **Kezeb** | (n.x.mê) can Mêlak. |
| **Kezî** | (n.x.mê) Çend davek pora(pirç) yan bendikên vehandî. :Kezîyên dirêj. Gizvanok. |
| **Kezîkur** | (ûk.I.çewa) Jina kezî lê hatîn birîn. :Çam bi serî hatî. :Wey kezî kurê ezê, eve çi xwelîye bi serê me werbû!. |
| **Kezîmar** | (ûk.l.çewa) Keça kezîkên wê mîna marê reş di reş û dirêj. |
| **Kezîsor** | (ûk.l.çewa) Jina kezîyên wê di dirêj. |
| **Kezîzer** | (ûk.l.çewa) l .Keçika kezîyêd wî di zer bin.2. Navê jinane. |
| **Kezwan** | (n.x.mê) Keskan. |

| | |
|---|---|
| **Kezwankelotin** | (k.jn.I.mê) Keskankelotin. |
| **Kezwanterik** | (nl.mê) Kezwanên ter,berî bi beûin. |
| **Kê** | (pêrb) rêvnan Alavê pisyarê. Pisyara Heyînê. Pisyara karî, boyerekê yan kesekî. :Kê wesa kir?.Kê got?. :Eve xanîyê kêye? Kî.Kê di vê?.Pend :Kê kir û kê xwar!. |
| **Kêbirkê** | (n.dar.mê) Leystokeke kî ji kê di bit. Berîkanê. |
| **Kêç** | (n.x.mê) candar Giyandarck kirmijoke li ser xwîna giyandaran, mirovan dijît kevneşop Pend :Kêçê mêçê, tu bi îsa kî tu bi mûsa kî tu ev şeve min aza kî. Ev gotina di nav kurdan de tê gotin ji ber eqên kêçan yên ne xweş. |
| **Kêçgir** | (pesnl.dz) Mirovê kêçan digirit û di kujit. |
| **Kêcgirtin** | (k.jl.mê) Girtina kêçan û kûştin. Pend : Korê(kûor) kêç girtî, ang;dema tiştek bi kevit destê mirovekî û êdî ji destan qurtal ne be. (K) bn: Girtin. |
| **Kêf** | (n.x.mê) Keyf Xweşî. |
| **Kêfkirin** | (k.jn.I.mê) Kefkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Kêfwes** | (ûn.l. çewa) Mirovê bi keyf. Rûxweş. |
| **Kêfxwesî** | (n.l.mê) Rûgeşî, Rûxweşî. |
| **Kêfxwesîkirin** | (k.jn.gl.mê) bn:Keyfxweşîkirin. |
| **Kêk** | (n.x.mê) Xwarineke ji ar, şekir, rûn,û corên fêqî dirist di ken bo cejin û bîranînan. |
| **Kêl** | (n.x.mê) l Berek venayî ye jibo sêregirtin û lêdanê çi bi çek yan berê destf. Nîşan. :Here kêlekê bi çiklîne da armancanê bi |
| **keyn. 2** | Tiştê bilind û berçav. |
| **Kêlan** | (k.jn.x.mê) Rakirina erdî û kolan bi hincar li dewaran yan terektiran jibo çandinê. : Cotyar zevîyê di kêlit. (K) bdn. ez di kêlimê em di kêlîn, tu di kêlî hûn di kêlin, ew di kêle[ it]ewan di kêhn. pr:dê bi + bdn. Bdb: di kêla, di kêlan. Db dûr: kêlabû,.... bûn.(F): bi kêle bi kêlin. |
| **Kêlanê** | (n.dar.mê) yarî Yarîyeka kevina kurdewarî ye, mirov xwe di kin du bir û her alek hemberî hevdu sê kêlan di venin,(çikilînin) ale ûersê kêlên berdijê xwe bêxit, serdikevit û xal bo di hên nvîsîn, bira hersêkêlên hemberî xwe bêxit û çi yên wê neketibin de sê xalan bi dest xweve hînit û sersax bit, lê eger yek yan du kêl di ketî bin kêlên berdij hemtiyan bêxit xalekê dê wergirit û cihên xwe gihorin. |
| **Kêlanêkirin** | (k.jn.gl.mê) Yarîya kêlan di kin. : Genc hemî yên li anga gundî kêlanê di kin. (K) bn :Kirin |
| **Kêlbe** | (n.x.nêr) Du didanên tîj yên lama serî û ûerdu rexên devê mirovî. Didanên giyadarên dirinde |
| **Kêlbetîj** | (ûk.I.çewa) Candarên dirinde yên xudan didanên tîj. |
| **Kêlbeşe** | (ûn.l.çewa) dijûn Ye didanên wî mîna kêlbeyên seyan bin. |
| **Kêlbetan** | (n.dar.nêr) Amêrekê hesinî bi destike û devê wî mîna kelbeyane jibo girtina bizmaran û deranîna wan bi kar di ûêt. |

| | |
|---|---|
| **Kêldan** | (k.jn.dar.mê) Dirûtina cilikan. : Kêlî lêdan. (K) bn: Dan. |
| **Kêlek** | (n.x.mê) Leş,cih Tenişt. Rex. Tî. AI. :Were li kêleka min (bi) rûne. |
| **Kêlendî** | (n.x.mê) Şalok. : Bi kêlendî giya dirî. |
| **Kêlgeli** | Erdê bi kêr kêlan û çandinê bi hêt Zevî Pawan. |
| **Kêh (n.x.mê)** | (hk.cih,n.x.mê) Berek pane wek kêlan liser gora mirîyan di çiklînin ûinde caran nav û bûna wî û ser di nivîsin. |
| **Kêlîk** | (n.x.mê) giya Berê çend corên gîyayî, di nav qelpekî da, hijmara wan cuda ji yekê û pitir. Kêlînok. Nîsik, htd. |
| **Kêlînok** | (n.I.mê) giya Kêlîkên nokan. |
| **Kêlûk** | (n.x.mê) Bo jinên dînê wan ne îslam yan neteweyên din, di hêt gotin. |
| **Kêlûn** | (n.x.mê) Kilîleka mezine, ji darî yan hesine, jibo daxistina dergehên mezin. |
| **Kêlûnkirin** | (k.jn.I.mê) Daxistin bi kêlûnê. (K) bn: Kirin. |
| **Kêm 1** | (n.x.mê) Şileyekê sipî û çire, li cihên (birîn) kul peyda di be. :Kêma keftî birîna wî. |
| **Kêm 2** | (pêrb.alv.çend) Ne zor. Ne gelek . Ne pir.: Me kêm pare hene. : Qelemekê min yê kême.Pend :kêman kêm jê di çin, zoran zor jê di çin.Pend :Kêm bi de ber dasê, da ne bit asê. |
| **Kêmanî** | (hn.dar.çewa) Kêmasî. :Bi kêma dê heftîyekê li mal mînim. |
| **Kêmaşî** | (hn.dar.çewa) Karê bi diristî ne hatî kirin, wek pêdvî pê ranebûn. Leng. Nîvberû. Qetlazî. : Supas bo we çi kêmasê li def me nînin. |
| **Kêmasîkirin** | (k.jn.l.mê) Encam nedane karî wek pêdvî.: Ewî çi caran kamasî di karê xwe da ne kirî ye. (K) : Kirin. |
| **Kêmbawer** | (hk.I.çewa) Mirovê kesatî ya wî lawaz. Reşbîn. |
| **Kêmbawerî** | (n.l.mê) Bêbawerî. Reşbînî. |
| **Kêmber** | (hk.l.çewa) Candar yan mitayê kêm berî di hînit. Xirş. |
| **Kêmbîr** | (hk.I.çewa) Mirovê zû tiştî jibîr di ke. Bîrkurt. |
| **Kêmbûn** | (k.jn.l.mê) Dema mita, pare, candar û htd kêm di bîn. Jêçûn. : Roj bo rojê tîtalên neçak kêm di bin. (K) bn: Bûn. |
| **Kêmdîtin** | (k.jn.I.mê) Çavtarîbûn. Xirab dîtin.(K) bn: Dîtin. |
| **Kêmendam** | (hn.l.çewa) Kesê ji alîyê canî ve leng. Pekkeftî. |
| **Kêmhedam** | (pesnl.dz) Kêmendam. |
| **Kêmî** | (n.dar.mê) Kêmbûn. |
| **Kêmkirin** | (k.jn.I.mê) Jinavbirin. Jêbirin.:Demhijmêra min kêm di ke.(K) bn: Kirin. |
| **Kêmtir** | (hn.dar.çend) Piçektir. Ji hindekan pîçektir. |
| **381** | |
| **Kêmtirîn** | (hn.dar.çend) Ji hemûyan piçektire. Gelek kêm. Pir kêm. |
| **Kêmûzêde** | (hn.I.çend) Ne kêm ne zêde. Navincî.Pitir yan kêmtir. |
| **Kêmxwîn** | (hn.l.çewa) Mirovê xwîna wî kêm be. |
| **Kêmxwînî** | (n.I.mê) derd Nexweşîyeke mirovî di girit ji encamê kêmbûna xwînê di canî da. |

| | |
|---|---|
| **Kêr 1** | (n.x.mê) Çeqo. Satork.Pend :Stoyê xwe da ber kêrê. ang; kesê nezan bi destê xwe ji xwe ra belayan di hîne. |
| **Kêr 2** | (hn.x.çewa) khêr Qenc. Baş. Mifadar. Hêja. nezan bi destê xwe ji xwe ra belayan di hîne. |
| **Kêr 2** | (hn.x.çewa) kUêr Qenc. Baş. Mifadar. Hêja. |
| **Kêrandin** | (k.jn.x.mê) Çêkirina tiştê bi kêrî karînanê bi hêt. Niijenkirîn. Bijînkirin.(K) bdn:ez di kêrînim em di kêrînîn, tu di kêrînî hûn di kêrînin, ew di kêrîne[...it] ewan di kêrînin. Pr:dêbi +bdn. Bdb : di kêrand, di kêrandin. Db,dûr : kêrandibû, kêrandibûn. (F) : bi kêrîne, bi kêrînin. |
| **Kêranîn** | (k.jn.l.mê) Bi karanîn. Kar pê kirin.bi Kêr înan. |
| **Kêrat** | (n.x.mê) tiraş Core dareka keske, biharîye,guleka zera biçûk di det û aveka şirîn têdaye zarok di mêjin, her jiber hindê di bêjinê mêjok, berê wî mîna fasolîyane, di nav kêlîkan da, tenê kewal di xwen di bêjinê pezpezok. . Tiraş. |
| **Kêrhatin** | (k.in.l.mê) Jibo karanînê dirist. Peyt. Bêkêmatî. Hêja. :Ev pêlave bi kêr te nahêt. : Ez bi kêr wî karî di hêm. (K) bn: Hatin. |
| **Kêrhatî** | (hk.l.çewa) Hejî. Hêja. Peyt. : Azad xortekê kêhatîye. Brx Kêrnehatî. |
| **Kêrik** | (n.dar.mê) Kêra berîkê. Kêra biçûk. |
| **Kêrîşk** | (n.x.dz) candar Giyandarekê şîrdere, malî û kûvîye. Xirnîk. Kêrûşk Kêvrûşk. |
| **Kêrîşk** | |
| **Kêrt** | (hk.cih,n.x.mê) Çalik. Cihê nikirandî. Cihê têkolayî. |
| **Kêrtkirin** | (k.jn.l.mê) Nikrandin. Têkolan. Qewartin.(K) bn :Kirin. |
| **Kêş 1** | (n.x.mê)I. Doz. Arêşe. Kêşa me kêşeka siyasî ye. |
| **Kêş 2** | (n.x.mê) Bariste. Giranî. Seng. :Kêşa vî kevirî du kîlo ne. |
| **382** | |
| **Kêş 3** | (n.x.mê) Karek fîzîkîye bo rakêşana tenan bi alîyê xwe ve. |
| **Kêşan** | (k.jn.x.mê) 1. Rakêşan bi alîyê xweve. înan. :Bar kêşan . 2. Mêtin. HiIkêşan.:Cigare kêşan. (K) bdn: ez di kêşim em di kêşin, tu di kêşî hûn di kêşin, ew di kêşe[...it] ewan di kêşin. Pr:dê bi + bdn. Bdb: di kêşa di kêşan. (F): bi kêşe bi kêşin. |
| **Kête** | (n.x.nêr) Darekê dirêj û raste bo ser avahî, yan diriskirina perjanan bi kar di hên. Nîre. |
| **Kêvjale** | (n.x.nêr) candar Giyandarekê hişkavîye, reqe, gelek çng heye, du destên wek cewbiran hene jibo girtina xwarinê û xwe parastinê. |
| **Kêvandin** | (k.jn.mê) Keyandin.Şilqandin. |
| **Kêz** | (n.x.mê) candar kêzik Giyandarek biçiike , gelek cor hene. Pend :Kêzê jî hate rêzê. |
| **Kêzgilolk** | (n.l.mê) candar kêzik Kêzeka reşe rîxa candaran di ke gilolk jibo xwarina xwe û têjikan di nav da di ke. |
| **Kêzgûgerîn** | (n.l.mê) candar kêz Kêzgilolk. |
| **Kiç** | (n.x.mê) l.Jina ne şwîkirî. 2.Nivşê mê yê daykûbaban, kiça wî, wê . Jîyan kiça mamê mine.Dot. Keç. |
| **Kiçane** | (hn.dar.çewa) Kelûpelên kiçan. :Pêlavqa kiçane. :Kirasê kiçane. |

| | |
|---|---|
| **Kicik** | (nazn.dar.mê) Kiça biçiik yan nazikkirin. |
| **Kif** | (hn.x.çewa) deng Dengê vemirandina agirî bi avê. Dengê daxkirina leş yan giya û tiştê ter. |
| **Kifên** | (n.dar.mê) deng 1. Dengê kifkifa agir û avê.2. Dengê marî, |
| **Kifênhatin** | (k.jn.l.mê) Dengê kifênê jê hatin. : Tilîya min bi agirî kevt kifên jê hat. :Kifêna marî ya di hêt!. |
| **Kifir** | (n.x.mê) tiraş Core dareke liber lêvên çeman hişîn di bin, gelek mezin nabin. Pend : Garîte ji kifran ranabin. Ang; daybabên kêrnehatî nivşê wek xwe berhem di hînin. |
| **Kifkif** | (n.dar.mê) deng Dengê ji dinfna mirov, giyandarên nexweş yan lewaz derdikevit. Pişpiş. |
| **Kifkifî** | (hk.dar.çewa) Mirovê kifkifê di ket. Pişpişî.:Zelamekê kifkifî. :Jineka kifkifî. |
| **Kifkifkirin** | (k.jn.l.mê) Dengê kifldfê jê hatin, anîn. : Ev peza kilmîşok çend kifkifê di ke. |
| **383** | |
| **Kifkirin** | (k.jn.I.mê) Mirov bi hêza bayî ji nav sîhan kilmîşî bo derve birêya kepîyê pal di de û di havêje derve. (K): bn: Kirin. |
| **Kifko** | (n.x.nêr) Kîfko. |
| **Kifliobûn** | (k.jn.I.mê) Kifkobûn. |
| **Kifrî** | (hk.cih,cugirn) Bajêrekê Kurdistana başûre. |
| **Kifte** | (n.x.mê) zad Core xwarineka kurdî ye, hevîrê danhêrkî pirî goşt û pîvaz di ken di avkêda tê kelandin yan birinc û goştê vestirî û di rûn yan avê da kelandî. Kutilk. |
| **Kik** | (hn.çewa) deng Dengê vêkketina didanan, lêkdana texma ser û binî. |
| **Kilçên** | (n.dar.mê) deng Dengê vêkkevtina didanan. |
| **Kikênhatin** | (k.jn.I.mê) Dengê kikênê di hêt guhê mirovî. |
| **Kil 1** | (n.x.nêr) Core dermanekê reng reşe, bo ciwanî û reşkirina çavan, jin bi kar di hînin.2. Kilçîv. |
| **Kil 2** | (n.x.mê) Çend caran livîna lêdan ûi kiyana meşkê. Şilq. Pal. |
| **Kilçan** | (n.x.mê) Eletirîk. Layêt. |
| **Kilçan** | |
| **Kilcav** | (n.I.nêr) Kilçîv. |
| **Kilçêv** | (n.l.nêr) bn: Kilçav. |
| **Kilçîv** | (n.I.nêr) Darikek lûleyî hulîye jin bo kildana çavan bi kar di hînin. |
| **Kildan** | (k.jn.I.mê) Çavkildan. Çavrengkirin.Çavreşkirin. :Xatûnê çavêd xwe kil dan. (K) bn: Dan. |
| **Kildank** | (n.I.mê) Tûrikek biçûke kil û kilçîv têda di hên hilgirtin. |
| **Kilêb** | (n.x.nêr) Xermaşe.Binkol. |
| **Kilêbkirin** | (k.in.l.mê) Zevî, rez, bi kilêbî hilûkirin. Xermaşekirin.(K) bn: Kirin. |
| **Kilêjî** | (n.x.mê) bn: Kelêjî. |
| **Kilik** | (n.x.mê) can Kurîya giyandaran. Dwîv.dûv. |
| **Kilikdar** | (hn.dar.çewa) 1. Candarên bi kilik. 2. Stêrên wesa xuya di kin ko kilik hene. |
| **384** | |

| | |
|---|---|
| **Kilisandin** | (k.jn.x.mê) Pêvenûsandin. Têdan. Pêradan. : Pilasterê bi destê xwe ve bi kilisîne.Nûsandin. |
| **Kilîl** | (n.x.mê) Amûrek ji hesin yan darî ye jibo daxistin û vekirina a dergehan bi kar di hêt. Seqat. Kîlûn). |
| **Kilîl (kêlûn)** | |
| **Kilîldan** | (k.jn.l.mê) Daxistina dergeh, sindoq, pencer û htd bi kilîlê. (K) bn: Dan. |
| **Kilîlkirin** | (k.jn.l.mê) Kilîldan. (K) bn: Kirin. |
| **Kilkirin** | (k.jn.l.mê) Kildan. ;Çavan kil di kein. (K) bn :Kirin. |
| **Kilmeşk** | (n.I.mê) Dema kil li meşkê di hêt xistin û di ber re di stirên; pend : kilmeşkê meşkînê , dar û loleb zêrînê. |
| **Kilmîş** | (n.x.nêr) Keresteyekê şil, nîsek û rone di nav sîhên mirov û giyandaran da di rêya difinê da derdikevit. |
| **Kilmîşkirin** | (k.jn.I.mê) Kifkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Kilmîşok** | (rd.hk,dar.çewa) Mirov yan candarê difin bi kilmîş. Kesê herdem kilmîş ji kepî yê di hêt xar. |
| **Kilosk** | (n.x.nêr) khilosk Amaneke ji axa taybetî hatîye diristkirin bo têxistina mita, pere, zêr û htd. Gozik. |
| **Kilox** | (n.x.nêr) candar Hestî  ye serê candaran yê mejî di nav da di hêt paraztin.: Kiloxê serê mirovan. Kulox. |
| **Kim** | (n.x.mê) Kum.Kulav. |
| **Kimax** | (n.x.mê) Kemax. |
| **Kimê** | (n.x.mê) Tepedora darî. |
| **Kimkime** | (n.dar.dz) candar Candarek xişok û biçûke liser kevir û beran di jît. Xemegur. |
| **Kin** | (hn.x.çewa) Hwîr Hûrik. Biçûk. Nizim. Nevî. |
| **Kinar** | (hkcih) Rex. Tenişt. |
| **Kinbûn** | (k.jn.l.mê) Têkçûn. Kurtbûn. (K) bn: Bûn. |
| **385** | |
| **Kinc** | (n.x.pir) Cil .Cilik. Berg. |
| **Kîngirtin** | (k.jn.l.mê) Kerb û kîn mirovî di gire. Torebûn. Çavsorbûn. |
| **Kînoyî** | (hn.dar.çewa) Kîndar. |
| **Kîr** 1 | (n.x.nêr) ***khîr*** Hedamê guhnelî yê nêr. |
| **Kîr** 2 | (hk.x.çewa) Kûr. |
| **Kîrbûn** | (k.jn.l.mê) Kûrbûn. |
| **Kîrkirin** | (k.jn.l.mê) Kûrkirin. |
| **Kîs** | (n.x.mê) Tûrik. Çantik. |
| **Kîse** | (n.x.mê) Kîs. |
| **Kîsele** | (n.x.dz) ***candar*** Candareke pişta wî bi kavlanek reqê hestî dapoşîye. Kûsî. |
| **Kîselfis** | (n.l.dz) Kîsele. |
| **Kîsk** | (n.dar.mê) Tûrikek biçûke tûtinê di kenê. Kîskê tûtinê. |
| **Kîso** | (n.x.dz) Kîsel. |
| **Kîş** | kîj. |

| | |
|---|---|
| **Kîşe** | (n.x.mê) Awayekê taybet ê zêdekirina berhemî ye,tayekê darê nemaze mêw, ji binê, di bin axê ve di kin, serê wê di cihek dî ra derdixin hişîn di bit dareka nû zêde di bit. |
| **Kîşekirin** | (k.jn.l.mê) Çêkirin û zêdekirina kîşeyan. (K): bn :Kirin. |
| **kîşê** | (gazn.dar.mê) ***rêzman*** Bangnavê jina direwîn. |
| **kîşo** | (gazn.dar. nêr) ***rêzman*** Bangnavê mêrê direwîn. |
| **Kîşwer** | (hk.cih,cugir,n) Çend welatek bi hev ra. : Kîşwera Asya, Efrîka, Ewropa û htd. |
| **Kîvar** | (n.x.mê) ***giya*** Corekê giyaye, bi stirî ye nêrika wî ya ter tamdare,xwarina mirov û candarane. Kerbeşk. Qîvar. |
| **Kîve** | (hn.pir) Pirsîna bizivîne, sent. Kuda. Bo kûve. : Tu dê sube kîve çî ?. |
| **Kîvî**1 | (n.biyan) ***Fêqî*** Fêqîyekê xweş û şirîne. |
| **Kîvî** 2 | (n.biyan) ***perinde*** Balindeye. |
| **Kloç** | (n.x.nêr) şaxê candaran. Kloçê bizinê. |
| **Koç** | (n.x.mê) Veguhastin yan dûrketin ji warê xwe. Mişext. |
| **Koçber** | (hn.dar.çewa) Kesê koç di bit. Mişextî. Aware. Revend. |
| **Koçek** | (karn,x) Zanayek piledar ê dînê êzidîyatî yê. |
| **Koçer** 1 | (hn.dar.çewa) Mirov ji warekî bo yê dî di çe. Gerok. |
| **Koçer** 2 | (malb,n) Hozeka kurdane. |
| **Koçerî** | (n.dar.mê) Jiyana gerok li dû çerwanan jibo pez û bizinî. |
| **Koçik** 1 | (n.x.mê) Mêvanxane. Sera. |
| **Koçik** 2 | (n.x.nêr) ***candar*** Seg. Se. |
| **Koçî** | (hk.dem) Mişextî. Sala koçî. |
| **Koçkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov û candar warê xwe bi cih di hênin. Mişextbûn. Awarebûn. (k): bn: Kirin. |
| **Kod** | (n.x.nêr) Cer. Cerik. Gozik. Avdank. |
| **Kodqelên** | (rd.l.çewa) Tişt yan mirov bi be egera bela û çaman. Kur. Beş. Serxwer. |
| **Koga** | (hk.cih,n.x.mê) Xanî yan dikanên mezin yên kirîn û firotinan. Firoşgeh. |
| **Koh** | (hk.cih,cugirn.x.nêr) Çiya. şax. |
| **Kok** 1 | (n.x.mê) Nivş. Berebab. : Ew di koka xwe ji gundê jêrî ye, lê li gundê me xwecihe. |
| **Kok** 2 | (hk.x.çewa) Peyt. Bi serûber. : Ezê kokim û çi ji min ne kême. |
| **Kokakola** | (n.biyan.l.mê) Vexwarinek şirîn û bi tame. Core xoşaveke. |
| **Kokandin** | (k.jn.l.mê) Peytkirin. Bi serûberkirin. Li karkirin.: Jiber cejin ê xelikê gundî hemûyan xwe kokandîne.(K): bdn: ez di kokînim em di kokînîn tu di kokînî hûn di kokînin, ew di kokîne[…it] ewan di kokînin. Pr:dêbi +bdn. BdB : di kokand, di kokandin. Db,dûr: kokandibû, kokandibûn. (F): bi kokîne, bi kokînin. |
| **Kokî** | (n.dar.mê) Ciwanî. Rindî. Peytî. |
| **Kokkirin** | (k.jn.l.mê) Kokandin. Peytkirin. Kêrê xwe kirin. |
| **Kol** 1 | (n.x.nêr) Xanîyên bê serûber ê bi herîyê hatîn diristkirin bo kewalî û hinde caran mirovan. |
| **Kol** 2 | (hn.x.çewa) ***khol*** Rût. Rîs. Xas. Serkol. Bê kulav û dersok. |

| | |
|---|---|
| **Kolan** 1 | (k.jn.x.mê) Rakirina axê bi pêmer yan makînan. Kêlan. : Dema kolana rezne. : Kakil yê bîstanê xwe di kolit. (K) bdn: ez di kolim em di kolîn, tu di kolî, hûn di kolin, ew di kole[..it] ewan di kolin. Pr:dê bi +bdn. Bdb: di kola, di kolan. Db,dûr: kolabû,.... bûn. (F): bi kole, bi kolin. |
| **Kolan** 2 | (n.x.mê) ***kholan*** Rê yan cadeyên navbera malan da. |
| **Kole** | (n.x.dz) Bend. Bindest. Reben. |
| **Kolebûn** | (k.jn.l.mê) Bindestbûn. Bendbûn. Perîşanbûn. (K) bn:Bûn. |
| **Koledar** | (karn.dar.dz) Mirovê xelikî wek kole bi kar di hînit. Zordest. Zordar. |
| **Koledarî** | (n.dar.mê) Jiyana bindestî. |
| **Kolekirin** | (k.jn.l.mê) Bindestkirin. Tepeserkirin. (K) bn :Kirin. |
| **Kolîn** | (k.jn.x.mê) bn: Kolan. |
| **Kolk** | (n.x.mê) Kolê biçûk.Kolkê mirîşkan. |
| **Kom** | (n.x.mê) Gelek. Zor. Piranî. :Komeka mirovan. :Komeka axê :Komeka candaran. |
| **Komando** | (nbiyan.x.nêr) Serbazên bi rahênanên nemaze meşiq kirîn. Leşkerê taybet. Pêşmerge. |
| **Komar** | (n.x.mê) Welatê ko serok lê di hêt hilbijartin. |
| **Komarî** | (hk.x.çewa) Sîstema welatên bi serok ko ji alîyê gel ve di hên hilbijartin. |
| **Kombûn** | (k.jn.l.mê) Lêk xirvebûn lihev civîyan. Civîn. (K) bn: Bûn. |
| **Komcivîn** | (n.l.mê) Kombûn. Civîn. |
| **Komel** | (n.x.mê) Civak. |
| **Komelayetî** | (hk.dar.çewa) Civakî. |
| **Komelgeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Civak. |
| **Komêdî** | (hk.biyan.çewa) Çîrok û filmên rexneyî bi awayê dilveker û kenok. |
| **Komik** | (n.dar.mê) Komên biçûk. Girik.: Komikên axê. |
| **Komikanê** | keomik neman, dê xwe lêk gihorin lê eger hinek komik man ne xirab kirî dê wek xal bo xwedîyên komikan hên tomarkirin û yarî dê hosa berdewam bit. |
| **Komkanê** | (n.dar.mê) Yarîyeke bi perikan di hêt kirin mirov di bin du deste û di leyzin. |
| **Komkirin** | (k.jn.l.mê) Civandin. Xirvekirin. : Kizirî gundî hemû li mala xwe komkirin. (K) :Kirin. |
| **Komir** | (n.x.mê) Avahîyek nemazeye liser daran tê diristkirin û banê wî bi axê digirin ji çavkekî agirî berdidinê ,jibo çêkirina rejîyê. Êton. Kûrik. |
| **Komirvan** | (karn.dar.dz) Xudanê yan rêvebirê komirê. |
| **Komîte** | (n.x.mê) Lijne. Deste. |
| **Komkar** | (n.dar.mê) Civat. Dezgeh. Komele. Navend. |
| **Komkirin** | (k.jnlmê) civandin. Xirkirin.(K) bn: kirin. |
| **Kompîyoter** | (n. cîhl.nêr) Makîna yan amêrê zanyarîyan. |
| **Komonîst** | (n.biyan.dz) Kesê ser bi partîya komonîstî ve. |
| **Kon** 1 | (hn.x.çewa) Kevin. |
| **Kon** 2 | (n.x.mê) ***can*** Qon. |
| **Kon** 3 | (n.x.nêr) Çadir. Xîvet. |
| **Konfirens** | (n.biyan) Civîneka nemaze jibo danûsitandin liser mijar û bûyerên giring. |

| | |
|---|---|
| **Kongire** | (n.biyan.) Civînên mezin jibo nirxandina desteya kevin û gihorînan bi rêya dengdanê . Civîn. |
| **Kontirat** | (nbiyan.x.mê) Girêdana peyman, rêkkevtinan li navbera alî, sazî yan kesan bo encamdana karekî yan diristkirina projeyan. Qonterat. Girêbend. |
| **Konterçî** | (karn.dar.dz) Kesê yan xwedîyê kontiratê. Qonterçî. Belênder. |
| **Kop** | (n.x.nêr) 1. Perdax. 2. Den. Cer. |
| **Kopî** | (nbiyan.x.mê) Amêrê libergirtina nivîs yan mînakan. Jêgir. |
| **Kopîkirin** | (k.jn.l.mê) Libergirtina kopî yan. : Min nasnameya xwe kopî kir heger berzebû da min mînaka wê hebe. Jêgirtin. (K) bn: Kirin. |
| **Kore** | (hn.x.çewa) ***khore*** Mirov yan giyandarê ne bînit. Nabîna.***Pend*** :Kore di bêje koreyî wêve here!. ***Pend*** :Kore na çite rava, pîremêr na bite zava. |
| **Korahî** | (n.dar.mê) Korebûn. : Korahî bi çavan da bi hêt. |
| **Koranî** | (n.dar.mê) Korahî. |
| **Koratî** | (n.dar.mê) Korahî. Çavtarî. |
| **Korbûn** | (k.jn.l.mê) Korebûn. |
| **Korebûn** | (k.jn.l.mê) Çavên mirov û candaran ji egera nexweşî yan zikmakî kore di be û êdî nikare bi bîne. (K) bn: Bûn. |
| **Korek** | (hk.cih,nx) 1. Çiyayekê bilinde li Kurdistanê devera Hewlêr. 2. Hêleka telefonên berîkane li Kurdistanê, bi bi navê heman çiya. |
| **Korekirin** | (k.jn.l.mê) Dema ji egera lêdan yan birîndarî yê çav kore di bin.(K) bn: Kirin. |
| **Koremar** | (n.l.nêr) Corekê marê jehirdare, jiber mitî ya wî bi kore navdenge. |
| **Korewar** | (hk.l.çewa) Kesê dûrî welatê xo û herdem bîrîya wî biket. |
| **Korewarbûn** | (k.jn.gl.mê) Ji xak welatê xwe dûrkevtin û bîrîya kesûkar, welat,war ûhtd kirin. |
| **Korewarî** | (n.l.mê) Evîndarîya war û welatî. |
| **Korewarkirin** | (k.jn.gl.mê) Mirov xwe yan êkî ji welat, war û cihwar ên wî bêbar bi ke ku herdem bîrîya wan bi ke. |
| **Korê** | (naz,hd,bang) Gazîkirina jina kore, hest birîndarkirin. |
| **Korî** | (n.dar.mê) Koratî. |
| **Korkirin** | (k.jn.l.mê) Korekirin. |
| **Koro** | (hd,gazn.dar.nêr) birîdarkirin, Gazîkirin zelamê kore. |
| **Kose** | (hk.x.çewa) 1.Zelamê bê rih simbêl. 2. Xapînok. 3. ***giya*** Corekê kulindên dirêje. |
| **Kosk** | (n.x.mê) Kotana biçûk. Kotana karikan. Kotana berxan. |
| **Kosp** | (n.x.mê) Asteng. |
| **Koş** | (n.x.mê) 1. Dehmen. 2. Hedamê mê yê guhnelî yê. |
| **Kot** | (n.x.mê) Çeper.Kozik. |
| **Kotan** | (n.x.mê) Li cihek rast dîwarekê kêtan çêkirî ,şêweyê bazinî yan lakêş bê bane û derek heye kewalî di xin nav bi taybetî li havînê. Tan. Perjan. |
| **Kotek** | (n.x.mê) Zor. Zordarî. Xurtî:Keotek ez karîm biser banî bikevim. |
| **Kotekî** | (hk.x.çewa) Zorî. : Dujminî bi kotekî axa me dagîr kirî ye.:Bi kotekî keça xwe da şû. |

| | |
|---|---|
| **Kotel** | (n.x.mê) 1.Burceka mezin û bilinde jibo ciwanîyê wek nîşan li cihên bûyerek lê hatî rûdan ava di ken û wêne, hêma û nivîs an liser di ken.2. Malcoyek stûnî ye jibo ava diçit ser aşî bi pengînit û hêza wê xurt bi bit jibo zivrandina berên aşî liser êk. |
| **Kotir** | (n.x.mê) Balindeyeka kûvî yal malî ye,pir reng hene.Kevok.:Kotir çevenga aşîyê ye. :Kotir li ser hêkên kurk bû. Kotir firî. |
| **Kotî** 1 | (n.x.mê) ***derd*** 1.Derdekê vegire,di bit egera gurîbûna pîstê mirovî. 2.Mirovê gurî.Kotî. |
| **Kotîbûn** | (k.jn.l.mê) Toşî derdê kotî bûn. Gurîbûn.(K) bn: Bûn. |
| **Kovan** | (n.x.mê) 1. Nexwe). Xem. Êş. Azar.Behî. Jan. 2. Navê mêrane. |
| **Kovandar** | (hk,hn.dar.çewa) Kesê bi kovan. Bi xem. |
| **Kovandarî** | (n.dar.mê) Xem. Nexweşî. Behîdarî. |
| **Kovar** | (n.x.mê) Govar. |
| **Kovik** | (n.x.mê) Amêreke binê wê borîyek zirav û serê wê firehe, jibo şilî kirine amanên der teng bi kar di hêt. |
| **Kovî** | (hk.dar.çewa) Dirinde. Hov. |
| **Kox** | (n.x.nêr) Kol. Kolk. |
| **Koz** | (hk.cih,n.x.mê) Cihê bi pîş û pelex, ko her gundekî para xwe heye, jibo çerîna kewal û dewaran. Pawan. :Koza gundê jorî.:Koza pezî. |
| **Kozik** | (n.x.nêr) Çeperê pevçûnan. |
| **Ku** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê girêdana hevekane. : Çewa ku ez hatim vêrê, min... . Ku careka dî karê wesa dubare be bit. Ko. |
| **Kubar** | (hn.x.çewa) 1. Rind. Ciwan. 2. Navê keçane. |
| **Kuç** | (n.x.nêr) Ber. Kevir. :Kuçek di kûçikî werkir. |
| **Kuçik** | (n.x.nêr) Du sê beran yan herîyê di din rex êkve têda agirê daran di hêt hilkirin jibo lênan û gerimkirina av û xwarinê. Kuçkê daran, gazê htd. Çavka agirî. |
| **Kuçikreş** | (hk.l.çewa) Mirovê çam bi ser hatî. Malwêran . |
| **Kuçikreşî** | (n.l.mê) Malwêranî. |
| **Kuçke** | (hk.cih,n.x.mê) Rêya ko dumahîya wê girtî. |
| **Kudî** | (n.x.dz) Kudîk. |
| **Kudîk** | (n.dar.dz) ***candar*** Têjika hirçê. |
| **Kufandin** | (k.jn.x.mê) ***deng*** Dengê kufênê[kifên] jê înan, wekvemirandina agirî bi avê. |
| **Kujî** | (hk.cih,nx.nêr) ***endaze*** Cihê derve yê avayîyan. Sê, çarkujî. Sî. Brx Qulaç. |
| **Kul** | (n.x.mê) ***derd*** 1.Cihekê êvitî û kêmgirtî, edavgirtî. Birîna gemar.2. Kovan . Derd.3. Êşên giran .4. Biryan. ***Pend*** :Kula Helebê bikevit mala dujminî. |
| **Kulafe** | (hk.x.çewa) Tirsonek. Kulekfireh. Bêzever. |
| **Kulareş** | (n.l.mê) Êşa zirav. |
| **Kulav** | (n.x.nêr) Perokeke bi qayda serî, mirov liser serê xwe dadinin jibo ciwanî yan xwe parastin ji serma û germayê. Kum.***Pend*** :kulavek kir serê wî.ang; xapandin. ***Pend*** :Kulavê xwe xar kir. Ang; piştrastî.tena. |
| **Kulavpiştanê** | (n.l.mê) Lîstikeke ; çend zaro bi awayekê bazinî di rûnin, yek li dora wan di zivire, bi dizîve kulavî li pişt hevalekê rûniştî di dane; heger wî hevalî zanî li |

| | |
|---|---|
| | pişt wîye dê dest dete kulavî û kevit pey hevalê xwe bi kulavan dê lêxit, heger ne zanî, hevalê di zivire dê gera zivirînaê berdewam bi ke ta di gehe nik yê kulav li pişt danaayî, dê dest havêt kulavî lê xit û ewjî dê bi awayê bazinî baz det ta di gehit cihê xwe û hosa yarî berdewam dê bit. |
| **Kulb** | (n.x.mê) Nemana xwarinê.Qetlazî. |
| **Kulbûn** | (k.jn.l.mê) Dema kulek li cihekê canê mirovî peyda di bit. (K) bn :Bûn. |
| **Kuldar** | (hn.dar.çewa) Kovandar. Birîndar. |
| **Kulek** 1 | (n.x.mê) Konek di dîwarî kolayî şêweyê, girovir, çarkujî û htd, bo têkirina kelûpelan. |
| **Kulek** 2 | (hn.dar.çewa) ***kholek*** Kuldar. Gurî. |
| **Kulekfireh** | (hk.l.çewa) Kulafe. Tirsonek. |
| **Kulfet** | (n.x.mê) Jin. Pîrek. Afret. :Kulfeta hêjay ya nexweşe. |
| **Kulik** | (n.dar.mê) Pirsikek mezine û edav digirit. Kul. :Kulikek ya li milê wî hatî. |
| **Kulim** | (n.x.mê) Destê miçandî. Mist. |
| **Kulimdanan** | (k.jn.l.mê) Dema mirov kummekê bi danit. :Kolim dana serî, gêj bû!. |
| **Kulimlêdan** | (k.jn.gl.mê) Kulimdanan. |
| **Kulind** | (n.x.mê) ***giya çandin*** 1.Giyayeke belg pane kulîkê zer di de.2. Berê kulindî ye, gelek cor, reng û qebare hene, jibo xwarinên cudaduda mifa jê di wergirin.Kundik. |
| **Kulî** 1 | (n.x.nê) ***candar khulî*** Giyandarek kirmijoke liser şînkatî dijît û ziyanê di gehînit çandinê. |
| **Kulî** 2 | (n.x.mê) Hirîya pez. |
| **Kulîlk** 1 | (n.x.mê) ***giya*** Gulên biçûk ,ciwan û rengîn yên li biharan geş di bin. |
| **Kulîpindk** | (n.l.nêr) ***candar*** Corekê kulîyan e di pindin. |
| **Kulkirin** | (k.jn.l.mê) Weke mirov bi be egera kulbûna cihekê li giyanê mirovî. :Hindî di difin a xwe di xebitî ya kul kirî. :Te bi wan kiryarêd çepel dilê min kul kir!. (K) bn :Kirin. |
| **Kulkulî** | (n.x.nêr) ***tewal*** Balindeyekê rengîne, ciwane, hêlîna xwe di kendalan da dirist di ket, xwarina wî mêşik û mêşhingive. Mêşxur. |
| **Kulkulî** | (hn.x.çewa) Mirovê bê bawer û gelek vira di ket. |
| **Kulore** | [kurore](n.x.mê) ***xwarin*** Corek nanê sitwîr û tirsîye liser sêl, tenûr yan pelan dirist di kin. ***Pend*** :Begzade kurore lê bûne kade. Ang; heger mirov birçî bo her tişt liber devî xweş di bit. |
| **Kulovank** | (n.dar.mê) ***can*** Nîva, gopika serî. Tirarê serî. :Selik dana ser kulovanka serê xo. |
| **Kulox** | (n.x.nêr) ***can*** Kelleya hestîyê req ya serê candara û mirovan, ko mejî têda di hêt parastin. |
| **Kum** | (n.x.nê) Kulav.***Pend*** :Serê keçel di kum da başe. |
| **Kumir** | (nl.mê) ***can khumir*** Goştê rengsor ê bi serî dîk û mirîşkan ve. Kumra dîkilî. |
| **Kumreş** | (hk.l.çewa) Kesê goman liser jina, yan mêrê xwe heye ko çav li dere. Dilpîs. Çavnebar. |
| **Kumzirî** | (n.l.nêr) ***kevin*** Kulavê asinî, jibo xwe paraztinê li cengê, şervanan li serê xwe di kirin. |

| | |
|---|---|
| **Kun** | (hk.cih,n.x.mê) Cihek vekirî. Cihek xulole. Kunmi)ik, curd, mar û htd. |
| **Kunbûn** | (k.jn.l.mê) Dema cihek , erdek kun di bit.(K) bn: Bûn. |
| **Kunc** | (hk.cih,n.x.mê) 1. Cihê xwe veşarina candaran. Kuna candaran. :Kunca rûvî. 2. Quncal. |
| **Kuncandin** | (k.jn.x.mê) ***khuncandin*** Dema mirov berekî yan tebelekê li yeka dî di de, bi hêz ji cihê wê di firîne û cihê wê di gire. (K) Bdn: ez di kuncînim em di kuncînîn tu di kuncînî hûn di kuncînin, ew di kuncîne[…it] ewan di kuncînin. Pr:dêbi+bdn. Bdb : di kuncand, di kuncandin. Db,dûr :kuncandibû, kuncandibûn. (F) : bi kuncîne, bi kuncînin. |
| **Kuncik** | (hk.cih,n.dar.mê) Kujî.Quncal. |
| **Kuncî** | (n.x.mê) ***giya*** Mitayekê dindik hûre, tehîn û gelek corên xwarinan jê çê di bin. |
| **Kund** | (n.x.nêr) ***balinde*** Core balindeyek çavzer û mezine,liser beran û kavlegundan di dadit û rava mişk û çûçikan di ket. |
| **Kundêle** | (n.dar.dn) ***candar*** Têjika berazî. Têjikê berazî. |
| **Kundir** | (n.x.nêr) Kulind. |
| **Kunêrî** | (n.x.mê) ***derd*** Kulikeka mezin û bi jane li canê mirovî di hêt. Qunêrî. |
| **Kunker** | (n.l.nêr) Amêrê tiştan pê kun di kin. |
| **Kunkirin** | (k.jn.l.mê) Vekirina kunekê di cihekî. Dîwar, erd, cok, dar kun kir. (K): bn Kirin. |
| **Kunmêrî** | (n.l.mê) Mala mêrîyan. Kuna mêrîyan. Gêlexur.:Kunmêrîyak di eywankê da heye. |
| **Kunork** | (n.dar.nêr) Kertik. |
| **Kur** 1 | (hk.x.çewa) ***khur*** 1. Xortê ko hêj jin ne anîye. Zigurd. 2. Nivşê nêr ji daybaban. Pis. |
| **Kur** 2 | (n.x.mê) ***khur*** Mirîşka ser hêkan. Kurk. |
| **Kur** 3 | (n.x.mê) Herî. Teqin. |
| **Kur** 4 | (hk.x.çewa) Serxwer.Kodqelên. :Kêrîşk giyanewerek kure. |
| **Kur** 5 | (hk.x.çewa) ***khur*** Kurt. |
| **Kurbeşk** | (kn.x.dz) ***candar*** Qurbeşk. |
| **Kurbûn** | (k.jn.l.mê) Kurtbûn.: Pora serê te kur be. (K) bn :Bûn. |
| **Kurd** | (nej.n) Kesê nasnameya wî kurdîye.Ser bi neteweya kurde. |
| **Kurdayetî** | (n.dar.mê) Xebat jibona azadî û doza gelê kurd. Kurdînî. |
| **Kurde** | (n.x.mê) Navê jinane. |
| **Kardewarî** | (n.dar.mê) Ziman, çand, kelepor, yên babkalên kurdan. Kevneşopên kurdan. |
| **Kurdistan** | (hkcih. cugir,n.mê) Welatê, warê kurdan. :Dujminan Kurdistan parçe kirin. sûz :Kudistan yan neman. |
| **Kurdistanî** | (neten.dar.dz) Welatîyên Kurdistanê. :Ew Kurdistanî ye lê ne kurde. |
| **Kurdî** | (hk,hn.çewa) 1 . Tişt. xwarin,ziman htd, yên kurdan. 2. Navê xortane. |
| **Kurdînî** | (ndar.mê) Kurdayetî. |
| **Kurik** | (n.dar.nêr) khurik Kurê biçûk. |
| **Kuriko** | (hd,gaz,nêr) Gazîkirina kurikî. |

| | |
|---|---|
| **Kurisandin** | (k.jn.x.mê) Kuncandin.(K) bdn:ez di kurisînim em di kurisînîn, tu di kurisînî hûn di kurisînin, ew di kurisîne[. ..it] ewan di kurisînin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : di kurisand, di kurisandin. Db,dûr :kurisandibû, kurisandibûn. (F) : bi kurisîne, bi kurisînin. |
| **Kurî** | (n.x.mê) can Kilk. :Kurîya çêlê. :Kurîya sey. :Kurîya kewî. |
| **Kurînî** | (n.dar.mê) Jîyana bêjinîyê. Hêşta kur. Zigurd. :Bi kurînî min karên weha ne kirîne, evca dê çewa noke kem!. |
| **Kurk** | 1 (n.x.nêr) Cilkeke di havên ser milan. Sako. Qemsele. Qapût. |
| **Kurk** | 2 (hk.x.çewa) Mirîşk û balindeyên liser hêkan jibo mariqkirinê. |
| **Kurkbûn** | (k.jn.l.mê) Dema baleinde li ser hêlak di mînin jibo têjik peyda bi bin. :Kewa me ya kurk bûy!. |
| **Kurkirin** | (k.jn.l.mê) Kurtkirin. :Mirîşkê xwe liser hêkan kurk kir. (K) bn: Kirin. |
| **Kurmam** | (n.l.nêr) Pismam. :Heval û Helgord kurmamên hevdu ne. |
| **Kurmanc** | (nejn) Kurd. |
| **Kurmancî** | (n.dar.mê) Kurdî. Xomalî. :Zarê kurmancî. :Bacankêd kurmancî. |
| **Kurmatîx** | (n.x.mê) can Kemax. |
| **Kurme** | (n.x.mê) çek Cifte. |
| **Kurmêwk** | (n.l.mê) Bistîka tayê mêwa tirî ya ter û nazik tama wê miz û xweşe.Qurmêwk. |
| **Kursî** | (n.x.mê) Amêrek çarpêpike, cihê rûniştin û pişta mirovî heye jibo liser rûniştinê bi kar di hêt. |
| **Kurt** | (hk.x.çewa) Alîyê biçûk ji dirêjî û panîya endazeyan.Tiştê kurt ; tiştê ne dirêj. Mirovê kurt ; mirovê ne dirêj. Jiyê kurt ; jîyê nedirêj.Têkçûyî. Kin. Nevî. |
| **Kurtan** | (n..x.nêr) Cilek nemazeye li ser pişta dewaran di bestin jiber barkirinê û xwe girtina barî, herwisa parastina leşê wan. |
| **Kurtane** | (n.dar.mê) Herîya li dîwaran di din. |
| **Kurtanekirin** | (k.jn.l.mê) Teqinkirina dîwaran. Hisîna dîwaran. (K) bn: Kirin. |
| **Kurtanker** | (karn.l.dz) Mirovê kurtanan dirist di ket. Karê wî çêkirina kurtanane. |
| **Kurtayî** | (hk.x.çewa) Kurtî. |
| **Kurtbîn** | (hk.l.çewa) Mirovê hizirteng. Kêm dîtin. :Xortekê kurtbîne. :Jineka kurtbîne. |
| **Kurtbînî** | (n.l.mê) Hizirtengî. Kêm dîtin. :Kurtbînîya te ji kêmbawerîya teye. |
| **Kurtbûn** | (k.jn.l.mê) Biçûkbûna tiştan. Têkçûn. : Kirskê min yê kurt bûye.(K) bn :Bûn. |
| **Kurtî** | (hk.çewa,n.dar.mê) Gotina kurt. Kurtvebirîn. :Rexê kurt yê tiştê pîvayî. :Bi kurtî; Pend Kurt û kirmancî. Dirêj nekirin. : Kurtîya nûçeyan. |
| **Kurtkirin** | (k.jn.l.mê) Birîna tiştekî ta kurt bi be. Vebirîn.Peyva xwe kurtkir. ; peyva xwe vebirî. :Piça serê xo kurt bi ke.(K) bn: Kirin. |
| **Kurtûkirmancî** | (hk.l.çewa) Dema mirovê axivtinker bi xwazit gotina xwe kurt vebirit û mijarê bi dawî bi hînit û himberê xwe tê bi gehînit. |
| **Kuş** | (n.x.mê) Bayê ji paşîya mirov yan giyandaran der dikevit . |
| **Kuşken** | (hk.l.çewa) Yê kuşan di kit. |
| **Kuşkirin** | (k.jn.l.mê) Dema kuş tê kirin. Baberdan. (K) bn :Kirin. |
| **Kut** | (hk.x.çewa) Tiştê, amêrê serê wî ne tîj. Serpan. Brˣ Tîj. |
| **Kutabûn** | (k.jn.l.mê) Bêdengbûn. Bi dawî hatin. : Gotina wî kuta hat; bi dawî hat. |

| | |
|---|---|
| **Kutakirin** | (k.jn.l.mê) Bi dawî anîn . Bêdengkirin.(K) :Kirin. |
| **Kutan** | (n.x.mê) 1.Guhnelîya navbera nêr û mêyan. Cotbûn. 2.Qutan. Lêdan. |
| **Kutayî** | (n.dar.mê) Dawî. Domahî. |
| **Kutbûn** | (k.jn.l.mê) Dema serê kêr, sator, das û htd kut di bit. (K) bn: Bûn. |
| **Kutek** | (hk.x.mê) Zor.xurtî. |
| **Kutekî** | (n.dar.mê) Zorî. Xurtî. |
| **Kutildew** | (n.l.mê) xwarin Xwarineka kurdîye, kutilkên arxavk yan goştî di kin nav dewî û di lênin. :Şîva me kutildewe.:Dayka min kutildew ya bo me çêkirî. |
| **Kutilk** | (n.x.mê) xwarin Girikên hevîr, danhêr, birinc û htd pir goşt, pîvaz û xwarinên din, di kelînin di nav avikanda yan di rûnî da di qelînin. |
| **Kutkirin** | (k.jn.I.mê) Serê yan devê amêran kut bi kî. (K) bn: Kirin. |
| **Kuxekuxkirin** | (k.jn.I.mê) Kuxîn. |
| **Kuxik** | (n.x.mê) derd Deng û bayê ji gerîya mirov derdikevit ji egera ketina madek di nava sîhên mirovî da, yan nexweşbûna sîhan. |
| **Kuxîn** | (k.jn.x.mê) Dema mirov di kuxit. (K) bedn: ez di kuxim em di kuxîn, tu di kuxî hûn di kuxin, ew di kuxe[...it] ewan di kuxin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : di kuxîm, di kuxî, dikuxîn. Db,dûr : kuxîbûm, bûy, bûyn, bû,... bûn. (F) : bi kuxe, bi kuxin. |
| **Kuzrandin** | (k.jn.x.mê) Şewitandina perên mirîşk û balindeyan liser agirî dako tu mû û per pêve nemînin dema di hêt lênan yan birajtin. Sotina mûyên mirovî. (K) bdn : ez di kuzrînim em di kuzrînîn, tu di kuzrînî hûn di kuzrînin, ew di kuzrîne[. . .it] ewan di kuzrînin. Pr :dê bi + bdn. Bdb : di kuzrand, di kuzrandin. Db,dûr: kuzrandibû, .... bûn. (F): bi kuzrîne, bi kuzrînin. |
| **Kuzrîn** | (k.jn.x.mê) Şewitîn. Sotin. : Pora wî li hindav agirê kuçkî kuzrî. |
| **Kûç** | 1(hk.x.çewa) Bizin û nêrîyên bê şax. :We çend bizinên kûç hene?. |
| **Kûç** | 2 (n.x.mê) khûç Stûna mezin ya ji ax yan ber û çîmentoyê hatî avakirin, bo ragirtin û ciwanîya banan. Dinge. |
| **Kûçê** | (hd,gaz.x.mê) Gazkirin û naznavê bizina kûç. |
| **Kûçik** | (n.dar.nêr) Se. Seg. |
| **Kûço** | (hngaz.dar.nêr) Gazkirina û naznavê nêrîyê kûç. |
| **Kûd** | (n.x.nêr) Amaneke ji dar yan naylon hatî çêkirin, şivan avê yan şîrî têda hildigirin. |
| **Kûk** | (n.x.mê) Nejad. Bingeh. Ew di kûka xweda wesane. |
| **Kûlîn** | (hk.cih,n.x.mê) Cihê paraztina dan û xwarinê.Kwar. Kogeh. |
| **kûnek** | (hn.x.nêr) Qondeh. |
| **Kûp** | (n.x.nêr) 1.Bilintirîn serê çîyay. 2. Perdaxa avê, çayê, htd. |
| **Kûr** | (n.x.mê) Çal. Qûr. Kend. |
| **Kûrekûr** | (n.dar.mê) Dengûdor. |
| **Kûremar** | (n.l.nêr) Corekê marên jihrdarin, li Kurdistanê pirin, di bêjin di korene, yan ji kore (bi xafilkî) ve gurzê xwe da di weşînin. Koremar. |
| **Kûrhe** | (n.x.mê) Amêrek wek meşkê ye bi pestanê bayek bihêz jê derdikevit bo xweşkirina agirî jibo helandin(buhujandina) asinî. |
| **Kûrhevan** | (pîşn.dar.dz) Kesê li ser kûrheyê kar di ke. |

| | |
|---|---|
| **Kûrik** | (n.dar.mê)1. Kûra biçûk. 2.Komir. Êtûn. |
| **Kûse** | (hk.x.çewa) Kose. |
| **Kûsel** | (n.x.dz) Kîsele. |
| **Kûsî** | (n.X.dz) candar Kîsele. |
| | Kûsî (kîsele) |
| **Kûş** | (n.x.mê) 1.Hedamê guhnelî yê gîyandarên mê. 2. Dehmel. |
| **Kûtal** | (n.x.mê) Perok. |
| **Kûtek** | (hk.x.çewa) Kutek. |
| **Kûtekî** | (hk.x.çewa) Kutekî. |
| **kûtekîkirin** | (k.jn.l.mê) Zorîkirin (K) bn : Kirin. |
| **Kûz** | 1 (n.x.mê) Erdê (cihê) çerwanê kewalan yê pawankirî. |
| **Kûz** | 2 (n.x.nêr) Gozik. |
| **Kwa** | (pêrb) rêzman Alavê pirsê. Ka.Kanê |
| **Kwanê** | (pêrb) rêzman Kanê. |
| **Kwar** | (hk.cih,n.x.mê) Cihê mita têkirinê. Embar. Kûlîn. Kar. Pend :Çi bi kin kwarê ew di hêt xwarê. |
| **Kwêt** | (hk.cih,weIn)WeIatekê erebîye. |
| **Kwîrinc** | (kam) Kesê pîşeya kwîrincî yê heye. |
| **Kwîrincî** | (kam.x.mê) Karkerê veçirîna hirîyê bi amêrek nemaze hirîyê vedçirit daku ji navêk bihêt der û paqij bibit , bo nivînan. |
| **Kwîstan** | (hk.cih.mê) Cih û warên xweş û fînik. Zozan.Feraşîn. |
| **Kwît** | (n.x.mê) Fîtik. |
| **Kwîtandin** | (k.jn.x.mê) Fîtandin. Fîtikvedan. |
| **Kwîxe** | (hnx.dz) Rîhsipî û mezinê hoz,gund yan taxî. |

# L

| | |
|---|---|
| **L** | (le) Pîta pazdehê ji abeya kurdî. |
| **La** | (hk.cih.x.mê) Alî. Rex. Tenişt. Kêlek. Tî. :Layê rastê. Layê çep. |
| **Labik** | (n.x.mê) Tepik. Xefk. |
| **Labor** | (nbiya.x.mê) Ezmongeh. Taqîgeh. |
| **Lac** | (n.x.nêr) Kur(khurr).Law.:Arî lacê Hêmin e. ang; kurê Hêmin e. |
| **Lacik** | (n.dar.nêr) Kurik. |
| **Ladan** | (k.jn.I.mê) Ji rê derkevtin. Serdaçûn.(K): ez ladidim em ladidîn, tu ladidî hûn ladidin, ew ladidit ewan ladidin. (F): (bi) lade ladin. |
| **Ladê** | (hk.cih,n.x.nêr) 1. Xanîyên mezin li gundan. 2. Gund. |
| **Lader** | (ndar.dz) Mirovê ladayî. |
| **Laf** | (n.x.mê) Axivtin. Gotin. |
| **Lafavêtin** | (k.jn.I.mê) Axivtin. Peyvîn. (K) bn: Avêtin.havêtin. |
| **Lafazan** | (rd.I.çewa) Pirbêj. |
| **Lafaw** | (n.x.mê) Dema av û çem ji egera befir û baranên mezin, boş di bin û bi ser avahî û rez bîstanan da di hên û ziyanê di gehînin.Lêhmişt. |
| **Laflafk** | (n.dar.mê) giya Corek giyaye, belg pan û keske, bi şakan xwe di dar û avahîyan di alîne bi ser di keve. Daralînk. |
| **Laflafok** | (n.dar.mê) bn: Laflafk. |
| **Lakêş** | (n.I.mê) endaze Şêweyekê endazeyî ye, dirêjî ji panîyê pêtire.:Xanîyekê lakêş. |
| **Lal** | (hk.x.çewa) Mirovê ne şêt (nikarit) bipeyvit, bi livînana destan danûsitandinan di ket. :ZeIamekê lal. :Jineka lal. |
| **Lalbûn** | (k.jn.l.mê) 1. Dema mirov lal di bit.2. Bêdengbûn. :Ji tirsan da lal bû.(K) bn: Bûn. |
| **Lale** | (n.x.mê) gul Helal. |
| **Lalelal** | (n.dar.mê) Lava. Hîvî. |
| **Lalelalkirin** | (k.jn.l.mê) Lavakirin.Hîvîkirin. |
| **Lalengî** | (n.biyan..mê)fêqî Corekê pirteqalan e, tîvkilê wan bi sanasî jê ve di bit. |
| **Lalezar** | (n.l.mê) Baxê laleyan. |
| **Lalê** | (hngaz.x.mê) Navê bangkirin yan naznavê jina lal. |
| **Laliş** | (hk.cih,n.x.mê) Cihekê pîroze û rûgeha êzdîyane li Kurdistana başûr. Lalişa noranî. |
| **Lalî** | (n.x.mê) derd Nexweşîya lalbûnê. |
| **Lalîk** | (n.x.mê) aman Sênî. Sênîk. :LaIîka pirî Danqute. |
| **Lalkirin** | (k.jn.l.mê) Bê ezmankirin. :Xwe lala ne ke!. (K) bn:Kirin. |
| **Lalo** | (hngaz.dar.nêr) Navê bangkirina zelamê bê ezman, lal. |
| **Lam** | (n.x.mê) leş Hestîyê devî ê didan liser rêz dibin. Lama serî û binî.Lama jêrî ,lama jorî. |
| **Lama** | (n.biyan) candar Candareke mîna deveyane û ji bizina mezintire. |
| **Lame** | (n.x.mê) leş Cot girêkên di kevin jêr herdu çavên mirovî. Hinarok. |

| | |
|---|---|
| **Lan** | (n.x.mê) Kunca candaran. |
| **Landik** | (n.x.mê) Amêreke ji darî hatî çêkirin, zarokan têda dinivînin. Dergûş. |
| **Laper** | (n.l.nêr) Layekê kaxezê. Berper. |
| **Lar** | (hn.x.çewa) Xar. |
| **Larbûn** | (k.jn.l.mê) Xwarbûn. Xarbûn. |
| **Larkirin** | (k.jn.l.mê) Xwarkirin. Xwehirkirin. Keçkirin. |
| **Lasayî** | (n.x.mê) Çavlêkirin. Zarvekirin. |
| **Lasayîkirin** | (k.jn.I.mê) Zarvekirin. |
| **Laser** | (n.dar.mê) Lehî.:Lasereka mezin li aqarî çêbûye, jiber barana zor. |
| **Lastîk** | (n.x.mê) 1. Keresteyekê nerim e. :Pêlava lastîkî, cantikê lastîkî. 2. Jêber. |
| **Laş** | (n.x.mê) can Leş. |
| **Laşgiran** | (hk.I.çewa) Westayî. Mandî. Leşgiran. Kerixî. |
| **Laşgiranî** | (n.I.mê) Nexweşî. Westan. |
| **Lat** | (hk.cih,n.x.mê) 1. Cihên bilind. Firake. Zinar.2. Coya mezin.3. Parçeka erdî. |
| **Latik** | (n.dar.mê) 1. Lata biçûk. 2. Malikên birinc, bacan, gul û htd. |
| **Latînî** | (nbiyan) Ziman û ênivîseka taybete ji çep bo rastî dest pê di ke, mîna zimanên îngilîzî, elmanî kurdî û htd. |
| **Latkirin** | (k.jn.I.mê) Çêkirina latikan jibo çandinê. :Me erdê xwe yê lat kirî dê birincî çînîn. |
| **Lava** | (n.x.mê) Hîvî. Daxaz. Lavlav. |
| **Lavakar** | (hk.dar.çewa) Kesê lava di ke. Kesê bo xwe hîvîya ji yekî di ke jibo alîkarîyekê yan azakirin û lêbûrînê. |
| **Lavakirin** | (k.jn.I.mê) Hîvîkirin. Hêvîxastin. Daxazkirin. Lavlavkirin. Qutabî gelek lava ji mamostayî kirin dako lê bi bore.(K) bn: Kirin. |
| **Lavje** | (n.x.mê) Sitran .Deng. Awaz. |
| **Lavjegotin** | (k.jn.I.mê) Stirangotin. Stirîn. : Ji kerema xo lavjekê jibo me bêje. (K) bn:Gotin. |
| **Lavlav** | (n.I.mê) bn: Lava. |
| **Lavlavkirin** | (k.jn.I.mê) bn : Lavakirin. |
| **Law** | (n.x.nêr) 1. Ciwan. Xuşkok. Qnc. Çak. 2. Xort. Genc. Cihêl. : Xortekê law. Jineka law. Xanîyek law. |
| **Lawaz** | (hk.x.çewa) Lewaz. |
| **Lawazbûn** | (k.jn.l.mê) Bçarebûn. Sistbûn. Mandîbûn. :Nêrîyê şivanî lawaz bûye, hindî yê westîyay. (K) bn :Bûn. |
| **Lawazî** | (n.dar.mê) Sistî . Xavî. |
| **Lawazkirin** | (k.jn.I.mê) Sistkirin. êxistin. |
| **Lawik** | (n.dar.nêr) 1. Corek kevine stiranên evîndarî, gelêrî kurdî ne . 2. Navê mêrane. |
| **Lawir** | (n.x.nêr) Giyandar. Candar. Canewer. |
| **Lawînî** | (hn.dar.çewa) Jiyê lawînî yê. Jiyana gencînî.Tiştê nû bit nûyatî. |
| **Laz** | (nej,n) Neteweyka ji Kafkazîya. |
| **Lebat** | (n.x.mê) Bizav. Xebat. |
| **Lebê** | (pêrb) rêzman Alavê pejirandinêye.Belê. Erê. |

| | |
|---|---|
| **Lebitandin** | (k.jn.x.mê) Dane axivtin. Bizivandin. Harkirin. Çelengkirin. (K) bdn : ez di lebitînim em di lebitînîn, tu di lebitînî hûn di lebitînin, ew di lebitîne[ ..it] ewan di lebitînin. Pr :dê(bi)+bdn. Bdb : di lebitand, di lebitandin. Db,dûr :Iebitandibû, lebitandibûn. (F) :bi lebitîne, bi lebitînin. Bi lebitîne. |
| **Lebitîn** | (k.jn.x.mê) Bizivîn. Çelengbûn. Livîn.(K) bdn : ez di lebitim em di lebitîn tu di lebitî hûn di lebitin, ew di lebite[. . .it] ewan di lebitin.Pr :dê(bi)+bdn. Bdb : ez di lebitîm em dilebitîn, tu di lebitî hûn di lebitîn, ew di lebitî ewan di Iebitîn.Db,dûr: ez lebitîbûm em lebitîbûyn, tu lebitîbûy hûn lebitîbûn, ew lebitîbû ewan lebitîbûn. |
| **Lebleban** | (hk.dar.çewa) Mirovê bi dev û ezman. Zorzan . Pirbêj. Devxoş. |
| **Legan** | (n.x.mê) aman Legen. |
| **Legen** | (n.x.mê) Amanekê firehe xwarinê tê di kin. |
| **Leglege** | (n.x.dn) perinde Balindekê kûvîye, lingdirêje, xwarina wî beq, mişk û marin. |
| | Leglege |
| **Leheng** | (hn.x.çewa) Çavnetirs. Palewan. Mêrçak. Mêrxas. :Pêşmerge di cengan da lehenge. |
| **Lehî** | (n.x.mê) Cih, kendalê ji egera barîna befir û baranan di herifit di bite kur di helweşit binî. |
| **Lemçelemç** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengeke ji devê mirovî di hêt dema zadxwarinê. :Lemçlemç a devê wî ye. |
| **Lemçelemçkirin** | (k.jn.gl.mê) Dengê lemçelemçê ji devî hatin. (K) bn : Kirin. |
| **Lempe** | (n.x.mê) Corekê fanosane, jibo ronahî, bi gazê kar di ke, şûşek bi ser binekê pan da girtîye û pelîtika wê agir pêveye, awîzkekê kêm û zêde kirinê heye, liser cihakî yan bi dîwarî ve di hailawîsin. |
| **Lenc** | (nhn.x.çewa) Xar. Badayî. |
| **Lencîn** | (k.jn.x.mê) Xwe badan. Xilingîn.(K) bdn : ez di lencim em di lencîn, tu di lencî hûn di lencin, ew di lence[...it] ewan di lencin. Pr : dê[bi] +bdn. Bdb : ez di lencîm em di lencîn, tu di lencî hûn di lencîn, ew di lencî ewan di lencîn. Db,dûr : ez lencîbûm em lencîbûyn, tu lencîbûy hûn lencîbûn, ew lencîbû ewan lencîbûn. [bi bû]. (F) : bi lence, bi lencin. |
| **Leng** | (hn.x.çewa) Xar. şil. Keç.:Mêrekê leng. :Jineka leng. :Bizina leng. |
| **Lenger** | (hk.dar.çewa) Yê pîyê wî ne rêk, di lengit. |
| **Lengîn** | (k.jn.x.mê) Li dema rêveçûnê mirov û giyandar di lengin. Nicimîn.(K) bdn: ez di lengin em di lengîn, tu di lengî hûn di lengin, ew di lenge...[it ]ewan di lengin. Pr:dê(bi) +bdn. Bdb : ez di lengîm, em di lengîn. Tu,ew(wî, wê) di lengî, hûn, ewan di lengîn, Db,dûr : ez lengîbûm,em lengîbûyn, tu lengîbûy, hûn, ewan lengîbûn, ew lengîbû,(bi bûn). (F): bi lenge bi lengin. |
| **Lep** | (n.x.nêr) ***can*** Dest. Mist. :Arasî lepekê şekirokan kirin berîka xwe .:Lepê hirçê. 411 |
| **Lepik** | (n.x.nêr) 1. Bendik. Rwîşîk. Destik. Lepkê cantey.2. Desgork. |
| **Leq 1** | (n.x.mê) Cihê leqa bi didanan. Gez. :Leqa vî zarokî gelek di êşit. |
| **Leq 2** | (hn.x.çewa) Livok. : Ev dare ya leqe.ang; di livit. |

| | |
|---|---|
| **Leq 3** | (n.x.nêr) Ta. Çeq. |
| **Leqandin** | (k.jn.x.mê) Livandin. Hijandin.(K) bdn: ez di leqînin em di leqînîn, tu di leqînî hûn di leqînin, ew di leqîne[..it] ewan di leqînin. Pr:dê bi + bdn. bdb: di leqand, di leqandin. db,dûr: leqandibû, leqndibûn. (F): bi leqîle, bi leqînin. |
| **Leqdan** | (k.jn.l.mê) Dema mirov xwarinekê yan tiştekî bi ke di devê xwe da û didanêd xwe liser bi givêşe. Geztin. (K) bn :Dan. |
| **Leqîn** | (k.jn.x.mê) Livîn. Bizivîn. :Didanê min di leqit.(K) bdn :ez di leqim em di leqîn, tu di leqî hûn di leqin, ew di leqe[…it] ewan di leqin.Pr :dêbi +bdn. Bdb : ez di leqam em di leqayn, tu di leqay hûn di leqan, ew di leq ewan di leqan. Db,dûr :ez leqabûm em leqabûyn, tu leqabûy hûn leqabûn, ew leqabû ewan leqabûn. (F) : bi leqe, bileqin. |
| **Leqkirin** | (k.jn.l.mê) Sistkirin. |
| **Leqleqok** | (hk.dar.çewa) Livlivok. :Stûna kepir ê ya leqleqoke. :Didanê leqleqok. |
| **Leqlêdan** | (k.jn.gl.mê) Leqdan. Geztin. :Leq li sêvê da. |
| **Leqyan** | (k.jn.x.mê) Leqîn. |
| **Leqandin** | (k.jndarmê) zivrandina tiştan. livandin. Hejandin.serê xwe leqand. Bejna xwe leqand ; leyzîn. (K) : ez dileqînin em dileqînîn, tu dileqînî hûn dileqînin, ew dileqînit ewan dileqînin. (F) : bileqî bileqînin. |
| **Leqyan** | (k.jmê) livîn. |
| **Leqleqok** | (hn.l) tiştê di leqit. Dilivlivit. Didanê leqleqok. |
| **Lerzandin** | (k.jn.x.mê) Livandin. Hejandin. :Xwe di lerzîne. (K) bdn : ez di lerzînim em di lerzînîn, tu di lerzînî hûn di lerzînin, ew di lerzîne[…it]ewan di lerzîninPr :dêbi +bdn. Bdb : di lerzand, di lerzandin. Db,dûr: lerzandibû, lerzandibûn (F): bi lerzîne, bi lerzînin. |
| **Lerzeta** | (n.l.mê) ***derd*** Nexweşîya melarîya. 412 |
| **Lerzîn** | (k.jn.x.mê) 1. Ji egera tirs, serma yan tayê leşê mirov di livit. : Ew yê ji serman da di lerzit. 2. Mirov bo keyf û şahîyan xwe di lerzîne. Govendkirin. şahîkirin. (K) bdn : ez di lerzim em di lerzîn, tu di lerzî hûn di lerzin, ew di lerze[...it] ewan di lerzin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : ez di lerzîm,em di lerzîn, tu di lerzî, hûn di lerzîn, ew di lerzî ewan di lerzîn. Db,dûr: ez lerzîbûm, em lerzîbûyn, tu lerzîbûy, hûn lerzîbûn, ew lerzîbû, ewan lerzîbûn. (F): bi lerze, bi lerzin. |
| **Lerzok** | (hk.dar.çewa) 1.Mirovê xwe di lerzînit.2. Lerzîn. |
| **Leş** | (n.x.nêr) ***can*** Laş Can. :Leşê mirovî. |
| **Leşker** | (n.x.nêr) Mirovê çekdar. Sûpa. Pêşmerge.Serbaz. |
| **Leşkergeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cih yan baregêyê meşqkirina leşkerî. |
| **Leşkerî** | (kar,ndar.mê) Pêşmergatî. |
| **Leşkerkêşî** | (n.l.mê) Komkirina leşkerî li berokekê bo hêşekê yan her karek serbazî. |
| **Leşkerxane** | (hk.cih,n.dar.mê) Leşkergeh. |
| **Leşsax** | (hk.l.çewa) Mirovê leşê wî peyt û çi nexweşî li dev nebin.Saxlem. |
| **Leşsaxî** | (n.l.mê) Saxlemî. :Leşsaxîya wî ji egera pir xwarina fêqîye. |
| **Let** | (n.x.mê) Pirt. Ker. Parçe. |
| **Letbûn** | (k.jn.l.mê) Kerbûn(***kherbûn***). Pirtbûn. |
| **Letkirin** | (k.jn.l.mê) Pirtkirin. |

| | |
|---|---|
| **Levan** | (n.x.mê) Leven. |
| **Leven** | (n.x.mê) ***darûbar*** Core hişînkatîyeke(tiraş) liber lêvên avanhişîn di bin , tilheka (ta) raste û girêgirêye û nîva wê xuloleye bo ciwanî, tan û avahîyan mifa jê dihêt wergirtin. Qamîş. |
| **Lewant** | (n.x.mê) Gulav. Bêhin. |
| **Lewaz** | (hk.x.çewa) Bêhêz. Bê goşt. Sist.Virçikî. :Mirovekê lewaz. :Bizina lewaz. |
| **Lewazbûn** | (k.jn.l.mê) Bêhêzbûn. Sistbûn.Kêm goştbûn.Helyan.(K) bn: Bûn. |
| **Lewazî** | (n.dar.mê) Nesaxî. Lawazî. |
| **Lewazkirin** | (k.jn.l.mê) Bêhêz- sist kirin . (K) bn: Kirin. 413 |
| **Lewçe** | (hk.x.çewa) Bêrûmet. Ezmandirêj. Hestîgiran. :Çi kurekê lewçeye!. |
| **Lewçebûn** | (k.jn.l.mê) Mirov bi kiryarek yan gotineka lewçe û kirêt li ber çavan di keve. :Ew wekî berê nemaye, gelekê lewçe bûy !. |
| **Lewçekirin** | (k.jn.l.mê) Xwe lewçekirin.ang ; xwe sarkirin li ber xelikî. |
| **Lewçeyî** | (n.dar.mê) Gotin û kiryarên kirêt. :Ew tu caran dest ji lewçeyîyêd xwe ber nade. |
| **Lewçeyîkirin** | (k.jn.l.mê) Mirovê gotin û kiryarên lewçe di ke. |
| **Lewe** | (n.x.mê) Teqin. Kur. Herî. |
| **Lewend** | (kk,hn.x.çewa) 1. Ciwan. Peyt. 2. Azad. Serbers.3. Navê mêrane. |
| **Lewendî** | (n.dar.mê) Parçe perokek sipî û dirêje di gel cilkên kurdî, zelam di zendikên xwe bo ciwanî di alînin, herwesa jin jî li ser kiras û fîstanan bi kar di hînin. |
| **Lewer** | (n.x.mê) Çerwan. Kûz. |
| **Lewerandin** | (k.jn.mê) Çerandin. |
| **Lewitandin** | (k.jn.x.mê)1. Xirabkirin. Wêrankirin. 2. Pîskirin. gemarkirin.(K) bdn: ez di lewitînim em di lewitînîn, tu di lewitînî hûn di lewitînin, ew di lewitîne[..it] ewan di lewitînin.Pr:dê bi+bdn. Bdb: di lewitand, di |
| | lewitandin.Db,dûr:lewitandibû, lewitandibûn. (F): bi lewitîne, bi lewitînin. |
| **Lewitîn** | (k.jn.x.mê) 1.Pelixîn. Heriftin. Pirbûn. Pengîn. 2. Pîsbûn.: Sigê wî di xuhê re lewitî. |
| **Lewra** | (pêrb) ***rêzman*** Peyveke jibo bi hevre girêdana hevekan. Jiberko. Dema. Ew dem. |
| **Leyzandin** | (k.jn.x.mê) Govendkirin. Lerzandin. |
| **Leyzîn** | (k.jn.x.mê) Govendkirin.(K) bdn: ez di leyzim em di leyzîn, tu di leyzî hûn di leyzin, ew di leyze[...it] ewan di leyzin. Pr: dê[bi]+bdn. Bdb: ez di leyzîm em di leyzîn, tu di lezî hûn di leyzîn, ew di leyzî ewan di leyzîn. Db,dûr: ez leyzîbû em leyzîbûyn, tu leyzîbûy hûn leyzîbûn, ew leyzîbû ewan leyzîbûn.(F): bi leyze bi leyzin. 414 |
| **Lez** | (n.x.mê) Kar yan bizava ko zû bi hêt kirin. Gîro nebit. : Bi lez here mal, bêje birayê xwe da bi hêt vêrê. ***Pend***: Min bûkek hîna bi lez û bez, sivika malê bûme ez. ang; dema dayk bûkekê jibo kurê xwe di hîne, jibo ku karê malê liser milên xesûyê sivik bike, berevajî karê girantir di bit bûk alîkarîyê nake.Lezgîn. Br×Hêdî. |
| **Lezandin** | (k.jn.x.mê) Lezkirin. : Bi lezîne here cem bapîrê xo û bêjê da bi hêt vêrê.(K) bdn: ez di lezînim em di lezînîn, tu di lezînî hûn di lezînînin, ew di lezîne[..it] |

| | |
|---|---|
| | ewan di lezînin. Pr:dê bi+ bdn. Bdb : di lezand, di lezandin. Db,dûr: lezandibû, ... bûn. (F): bi lezîne, bi lezînin. |
| **Lezgîn** | (hk.hn,dar.çewa) 1. Bi lez. :Peyameka lezgîn û bersiveka lezgîn.2. Navê mêrane. |
| **Lezgînî** | (n.dar.mê) Lez. Bi lez. |
| **Lezîn** | (k.jn.x.mê) Lez. : Lezîna hajotina tirobêlê 120 km/dem. |
| **Lezkirin** | (k.jn.l.mê) Bizavkirin jibo zû karekî bi cih bînin.  Lezandin.(K) bn:Kirin. |
| **Lê** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke hevberkirinê ye. jiber hindê. Belê. :Ez dê digel te hêm, lê bawer nakim merema me bi cih bi hêt. :Azad hat lê Helgord ne hat!. |
| **Lêbelê** | (pêrbl) ***rêzman*** Lê. Jiberko. |
| **Lêbok** | (hk.n.dar.çewa) Mirovê bi cil, reng û gotinan keyf û kenya xelikî di hînit.Kenok. |
| **Lêçûn** | (k.jn.l.mê) Pêveçûn. Wekhev. :Ew li babê xwe di çe.:Li heman rê çûn.:Agir li pelexî xweş çû. |
| **Lêdan** | (k.jn.l.mê) Qutan. Êşandin.Azardan. Lêxistin. :Nabit mamosta li qutabîyan bi den, çunke lêdan qedexeye. (K) bn: Dan. |
| **Lêder** | (kar.dar.dz) Kesê li amêrekê mûzîkê di de. Mûzîkvan. : Evîn lêdera tembûrê ye û Hêja lêderê kemançê ye. |
| **Lêgerîn** | (k.jn.dar.mê) Dema mirov li karek yan kesekî bi gerit.: Eve çende ez li te di gerim, tu li kîrê bûy?. (K) bn: Geran [gerîn]. |
| **Lêgeryan** | (k.jn.x.mê) Lêgeran.Lêgerîn. |
| **Lêhatin** | (k.jn.dar.mê) Dema tişt bê renckêşan yan zanîn bi dest mirovî di kevin.; ***Pend***: Ma dê her bo lê hêt?. ***Pend*** :Lêhatin çêtire, ji jêhtinê. (K) bn: Hatin.      415 |
| **Lêhatî** | (hk.dar.çewa) Mirovê bi şens. |
| **Lêhmişt** | (n.x.mê) Tiştê bi komel , karekê bi komel, çamek mezin,  êşek komkuj. Barovek wêranker,htd. |
| **Lêkçûn** | (k.jn.l.mê) Pêkveçûn. : Ev du xwîşkên han gelek lêk di çin!. |
| **Lêkdan** | (k.jn.l.mê) 1. Dema mirov tenekî li yê din di de.:Destêd xwe lêkdan. :Tirombêlan lêk dan.2. Lêkdana hijmaran. : Duwê li duwê bi de dê bit çar. 2×2= 4.(K) bn: Dan. |
| **Lêkdayî** | (hk,hn,.dar.çewa) 1. ***rêzman*** Peyveka ji du yan pitir peyvan hatî avakirin; mîna serbilind. Çavbelek û htd. Celeb.2. Peyt. Rapêçayî. Bi serûber. :Xortekê lêkdayî. :Jineka lêkdayî. :Maleka lêkdayî. |
| **Lêkderkirin** | (k.jn.l.mê) Ji hev birin. Jêkbirin. :Êkê ji siyan bi bin dê mînin du.3-1=2. Jêbirin. |
| **Lêker** | (n.dar.nêr) ***rêzman*** bn :Jêder. |
| **Lêkevtin** | (k.jn.dar.mê) Bi wî-wê-wan kevtin.Pê kevtin. Vê kevtin.: ***pend*** Çûçik bi darê wî keft. |
| **Lêkgeran** | (k.jn.l.mê) Li êk geran. Pisyara êk kirin. |
| **Lêkirin** | (k.jn.dar.mê) Jêkirin. Jêvekirin.:Belg li darê kir. |
| **Lêkkevtin** | (k.jn.l.mê) Pevçûn. Pevdaçûn. |
| **Lêkolîn** | (n.dar.mê) Li peyçûna kar, nûçe yan bûyeran. (K): ez lêdikolim em lêdikolîn, tu lêdikolî hûn lêdikolin, ew lêdikolit ewan lêdikolin. (F): lêbikole lê bikkolin. Vekolîn. |
| **Lêkolînvan** | (karn.dar.dz) Yê kar û pîşeya wî lêkolîn. :Pismamê min lêkolînvane. |

| | |
|---|---|
| **Lêkvekirin** | (k.jn.l.mê) Parvekirin. Pişikkirin. :Dehan liser pêncan lêkveke dê mînin du. 10÷5=2. |
| **Lêlav** | (n.x.mê) Lûlav. |
| **Lêlê** | ; (alv) Gotineke di lawik û heyranan da bi kar di hêt. Br×Lûlû. |
| **Lêmişt** | (n.dar.mê) Lêhmişt. |
| **Lêre** | (hk.cih) Vê dirê. Vêrê. |
| **Lêrabûn** | (k.jn.dar.mê) Serhildan. Dij rabûn. :Demê hêrişa dujminî hatî, xelik lê rabûn û (K) ji deverê derêxistin. bn : Rabûn. 416 |
| **Lêv** | (n.x.mê) 1.***can*** Parçe hedamek reng pîvazî ye li ser devê mirovî .***Pend*** :Lêv pêştirin ji didanan..Ang ; xizim û nas ji biyanîyan pêştirin. 2. Rex. Kinar. : Lêva cem. Lêva rûbarî. |
| **Lêvabinî** | (n.l.mê) ***can*** Lêva di kevit alê binî yê devî. |
| **Lêvajêrîn** | (n.l.mê) ***can*** Lêva binî. ***Pend*** :Lêva jêrîn li ya jorîn ne da.Ang ; mit bû. |
| **Lêvajorîn** | (n.l.mê) ***can*** Lêva serî. |
| **Lêvaserî** | (n.l.mê) ***can*** Parçe lêva di kevit serî, ya zelaman simbêl dikevin ser. |
| **Lêvbilîl** | (hk.l.çewa) Mirovê lêvên wî di bilind .Lêvmûç . |
| **Lêvbilûr** | (hk.l.çewa) Lêvbilîl. |
| **Lêvkirin** | (k.jn.l.mê) Zanîna çewayî ya diris xandina [dengên] peyvan. (K) bn: Kirin. |
| **Lêvkî** | (hk.dar.çewa) Bi lêvan. |
| **Lêvmûç** | (hk.l.çewa) Mirovê lêvên wî derkeftî bin, bilind bin, dirêj bin. |
| **Lêvşîn** | (hk.l.çewa) Mirovê navçavgirê. Girtî. Mirûto. |
| **Lêvşûr** | (hk.l.çewa) 1.Mirovê niznizî, nexasim zarok.2. Lêvmûç. |
| **Lêxistin** | (k.jn.dar.mê) Lêdan. Qutan. :Lê xe. :Gavanî li gay xist. (K) bn: Xistin. |
| **Lêxweşbûn** | (k.jn.l.mê) Azakirin. Lêbûrîn.(K) bn : Bûn. |
| **Lêxweşhatin** | (k.jn.l.mê) azakirin. (K) bn: Hatin. |
| **Lêzim** | (n.x.pir) Xizimê glek nêzîkî mirovî. Kirîvê xwînê. Xêzan. |
| **Li** | (pêr) ***rêzman*** Alavek girêdane, jibo cihî. Ez li mal mame. :Li Kurdistanê befir di barit. Li bin, rex, ser, tenişt , htd. :Tu li kîrê bûy?. |
| **Lib** | (n.x.mê) Dindik. :Libeka nokê. :Libeka hinarê. |
| **Liba** | (Pêr.l) ***rêzman*** Li nik. Li cem. Li def. |
| **Libin** | (n.x.mê) Bilokên ji herî yan çîmentoyê hatîn çêkirin bo avakirina dîwar û xanîyan. 417 |
| **Libhinar** | (n.l.mê) Libên hinaran. Dindikên hinaran. Dindikhinar. |
| **Licem** | (pêrb.l) ***rêzman*** bn : Liba. |
| **Lidef** | (pêrb.l) ***rêzman*** bn: Liba. |
| **Lihevhatin** | (k.jn.l.mê) Pêkhatin. :Piştî cire û pevçûnan, gundîyan ew li hev hînan. (K) bn : Hatin. |
| **Lihevhatî** | (hk.l.çewa) Xweşik. Rind. Ciwan. Rapêçayî.Lêkdayî.:Keçeka lihevhatî. |
| **Lihêf** | (n.x.mê) Pateyekê stûre pirî hirî, mirov jibo xewê bi ser xwe di dadin.: Lihêfa hirî, pembû, pate û htd. |
| **Lijne** | (n.x.mê) Deste. Komîte. |
| **Linik** | (pêrb) ***rêzman*** bn: Liba. |

| | |
|---|---|
| **Limbîs** | (n.x.nê) ***can*** Parçeke dirêje bi serê fîlî ve jibo girtina pîş û pelexî yan av vexwarin û xwe terkirinê bi kar di hînit. |
| **Ling** | (n.x.nê) ***can*** Parçeya leşî ji kemax ta binê pêyî ,ran û baq bihev re. :Ligê nêrî yê birîndar bûy. |
| **Lingdirêj** | (hk.l.çewa) Mirov yan giyandarê lingên wî dirêj bin. Pêdirêj. ::Leglege balindeyekê lingdirêje. |
| **Lingteşî** | ( hk.l.çewa) Mirovê lewaz yê lingên wî zirav wek teşîyan. |
| **Lingzirav** | (hk.l.çewa) Lingteşî. |
| **Lingo** | (hk.çewa) Mirovê lenger. |
| **Liq** | (n.x.nêr) Çeq. Ta. :Liqê êketîya mamostayan. |
| **Liva** | (n.x.mê) Hirîya berxan. Hirî. :Balîfkêt ji livayê. |
| **Livandin** | (k.jn.x.mê) Hejandin . Leqandin. Ba belgên daran di livînit. (K) bdn: ez di livînin em di livînîn, tu di livînî hûn di livînin, ew di livîne[...it] ewan di livînin.Pr :dê bi + bdn. Bdb: di livand, di livandin. Db,dûr : livandibû, ...bûn. (F): bi livîne bi livînin. |
| **Livîn** | (k.jn.x.mê) Bizivîn. Na rewestan. Civcivîn. (K) bdn: ez di livim em di livîn, tu di livî hûn di livin, ew di live[..it] ewan di livin. Pr :dê bi + bdn. Bdb : ez di livîm, tu,ew di livî, ewan, em, hûn di livîn. Db,dûr : ez livîbûm, em livîbûyn, tu livîbûy, hûn,ewan livîbûn, ew livî bû. (F): bi live bi livin. |
| **Livok** | 1 (hk.dar.çewa) Leqok. 418 |
| **Livok** | 2 (n.dar.mê) ***can*** Gehên leşî. |
| **Lixaf** | (n.x.nêr) Hevsareke di xin ser ser û devên dewaran û hindek di kevit nav devî jibo siyar bi karit li dema pêdvî bi rawestînit. |
| **Lixafkirin** | (k.jn.l.mê) Lixaf xistin ser devê dewaran. : Hespê xwe lixaf kir.(K) bn : Kirin. |
| **Liyan** | (n.x.mê) Depekê pane li zivistanê dema befira stût di kevit,bi binê pêyan ve bi bendikan girê di din dako pêyên mirovî di befirê da ne çin xar. |
| **Lîfik** | (n.x.nêr) Parçek peroyê zivir e mirov leşê xwe pê di şon. |
| **Lîfikdan** | (k.jn.l.mê) Mirov lîfikê kefdayî li canê xwe di de dako pakij bi be. (K) bn : Dan. |
| **Lîfikkirin** | (k.jn.l.mê) Lîfikdan. :Da pîçek giyanê xo lîfik bi kin, ezê qirêjî bûym. (K) bn :Kirin. |
| **Lîhaz** | (n.x.nêr) Asinek dirêj û tunde jibo rakirina beran bi kar di hînin, alekî di êxin bin berê asê û hêza xwe biser alê dî da di kin tanî bi hêt wergeran. Qirase. |
| **Lîkav** | (n.l.mê) Şileya di devî da. Tif. Gilîz. |
| **Lîlîk** | (n.dar.mê) Lîlaqên qerîsê yên li zivistanên seqem, bi kevir û sivandan ve çê di bin. Sîqal. |
| **Lîne** | (n.x.nêr) Cerek mezine doşav, av yan mitayî tê di ken.:Lîneyê doşavê. |
| **Lîre** | (n.x.mê) 1. Pirsikên sor li leşê mirovî peyda di bin ji egera toz yan pêvedana adîyan .2 gogokên liser ristikên zêrî. |
| **Lîrîn** | (k.jn.x.mê) Lûrîn. |
| **Lîs** | (hk.cih,n.x.nêr) Cihê hewana teyr û tewalan. Lîsê kew, sîsk û htd. |
| **Lîsbûn** | (k.jn.l.mê) Balinde karê nivistê di kin û di lîsê xwe da di nivin. :Mêzeke kewê me çi ciwan yê lîs bûy!. |
| **Lîsik** | (hn.x.çewa) Jiber ba û barovan cilkên mirov hemû ter(şil) di bin. Ter. :Ez li ber baranê bûm lîsik. |

| | |
|---|---|
| **Lîskirin** | (k.jn.l.mê) 1. Dema nêçîrvan dîvçûna kew û tewalan di kin ta lîsê wan aşkira di ken.2. Dîvçûna gomanlêkirîyan û destnîşankirina cihê wan. .(K): bn Kirin. |
| **Lîste** | (n.x.mê) Kaxeza nav yan navnîşan liser rêzkirîn. Lîsteya navên xwendekaran li cem mamostaye. Xişte. 419 |
| **Lîstik** | (n.x.mê) Yarî. Werziş.: :Lîstika çînganê. :Lîstika dartiranê. |
| **Lîstikvan** | (karn.dar.dz) Yarîvan. Werzişvan. |
| **Lîstin** | (k.jn.x.mê) Yarîkirin. Lîztin.(K) bdn: ez di lîzim em di lîzîn, tu di lîzî hûn di lîzin, ew di lîze[…it] ewan di lîzin. Pr: dêbi+bdn. Bdb : ez di lîzam em di lîzan, tu di lîzay hûn di lîzan, ew di lîza ewan di lîzan.Db,dûr :ez lîzabûm em lîzabûyn(bûn), tu lîzabûy hûn lîzabûn, ew lîzabû ewan lîzabûn. (F) : bi lîze, bi lîzin. |
| **Lîstok** | (n.dar.mê) Yarîyên zarokan. Bûkên zarokan. |
| **Lîtav** | (hk.cih,n.l.mê) Cihê av û xiz têkel ku hin caran mirov yan candar tê di çikilin. Avzih. |
| **Lîztin** | (k.jn.x.mê) Yarîkirin. Lîstin.: Em dê bi topa pêy bi lîzin. |
| **Lo** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê girêdanê ye ; Dê ka were lo. |
| **Lobîk** | (n.x.mê) ***giya*** Çavreşk. |
| **Loke** | (n.x.nêr) Pembû. |
| **Loma** | (pêrb) ***rêzman*** Lewra. |
| **Loqe** | (n.x.mê) Bazdana hespan ya ko xwe di hilavêjin û dengek mezin ji pêyên wan di hêt. |
| **Loqekirin** | (k.jn.l.mê) Bazdana bi loqe ya hespan. (K) bn : Kirin. |
| **Lor** | (nej.n,hk.cih) 1. Kurdên bi zarê lorî di peyvin.2.Devera loran. |
| **Lorandin** | (k.jn.x.mê) Gotina stiranên xem û xerîbî yê, nemaze dayk di ber landika savan. (K) bdn : ez di lorînim em dilorînîn, tu di lorînî hûn di lorînin, ew di lorîne[..it] ewan di lorînin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : di lorand, di lorandin. Db,dûr : di lorand, dilorandin. |
| **Loristan** | (hk.cih,cugir.devern) Devera loran. |
| **Lorik** | (n.x.nêr) ***spîyatî*** Xwarineka rêçalî ye. |
| **Lorîn** | (k.jn.x.mê) 1.Stirîn. Gotina awazên xemdar. 2. Dengê gurg, se û rûvî yan. (K) bdn: ez di lorim em di lorîn, tu di lorî hûn di lorin, ew di lore[..it] ewan di lorin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : ez di lorîm, tu, ew di lorî, em, hûn, ewan di lorîn. Db,dûr: ez lorûbûm em lorîbûyn, tu lorîbûy hûn lorîbûn, ew lorîbû ewan lorîbûn.(F) bi lore, bi lorin. |
| **Lotik** | (n.x.mê) Xwe havêtina hindek tewalan bi herdu pêyan nexasime çûçik. : Têjika kewî hêjta nafirit, lê bi lotikan di çit. |
| **Lûç** | (hk.x.çewa) Kakilkên tîvkil jê kirîn. Sipîkirî. Kevil di ser da çûye. |
| **Lûçbûn** | (k.jn.I.mê) Kevil di ser da çûn.:Tilîya min kevt bin berî jiber hindê lûç bû. |
| **Lûçîsk** | (n.x.mê) Kakila ji kelp kirî.:Lûçîska bahîvê. |
| **Lûçkirin** | (k.jn.l.mê) Kevilkirin. Sipîkirin. Ji kelp kirin. (K) bn:Kirin. |
| **Lûçkirî** | (hk.l.çewa) Kevilkirî. :Bahîvên lûçkirî. |
| **Lûlan** | (hk.cih,devem) Devereke li Kurdistana baştir. |
| **Lûlav** | (n.dar.mê) Befîra bi av û bihojî. Lêlav. |
| **Lûlbûn** | (k.jn.l.mê) Mîna lûleyan lê hatin. Xelekbûn. |

| | |
|---|---|
| **Lûie** | (n.x.mê) Borî. Lwîlî. |
| **Lûletiveng** | (n.I.mê) Lûlîya tivengan ya xilole ko gule jê der di kevin. |
| **Lûleyî** | (hk.dar.çewa) Şêweyê wek lûle, borî. |
| **Lûlkirin** | (k.jn.I.mê) wek lûleyan çêkirin. Xelekkirin.: Wê pora xwe Itil kirî ye. |
| **Lûr** | (nej.n) bn:Lor. Lorî. |
| **Lûs** | (hk.x.çewa) Hilû. Hilî: Erdê Itis. |
| **Lûsbûn** | (k.jn.l.mê) Hilûbûn. |
| **Lûskirin** | (k.jn.l.mê) Hilûkirin. |
| **Lûtke** | (hk.cih,n.x) Gopik. Kopik. Ser. |

# M

| | |
|---|---|
| **M** | (me) Pîta şazdehê ji abeya kurdî. |
| **Ma** | (pêrb) rêzman Alavê pisyarkirinê, jibo misogerkirinê:Ma tu ne çûye mal ?. Ma dê heta kengî hosa mînîn ?. Ma heger min zanîba hoye, da çewa we kem. Qey.Qemî. |
| **Macîk** | (nbivan.x.nêr) Corek qelemane, nivêsîna wan ya gir û di rengînin. |
| **Maç** | (n.x.mê) Mirov lêvên xwe di gehînit lêv yan rûyên kesek |
| | xweşdivî dengî ji devê xwe di hînit. Ramûsan. |
| **Maçajûnê** | (nl.mê) Maçeke ya mirov pif di kit devê kesê bêhoş (bêhinçik) dako dubare bêhina wî bêt û biçit. |
| **Maçamirinê** | (n.I.mê) kevin Kesê xiinmêj(vampîr) bi di danan leqadi havêjinû xwînê ji leşê mirovî di mêjin. |
| **Maçandin** | (k.jn.x.mê) Maçkirin. (K) bdn:ez di maçînim em di maçînîn, tu di maçînî hûn di maçînin, ew di maçîne[...it] ewan di maçînin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb: di maçand, di maçandin. Db,dûr: maçandibû, maçandibtin. (F): bi maçîne, maçînin. |
| **Maçîn** | (k.jn.x.mê) Maçkirin |
| **Maçkirin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov yekî maç di kit.(K) : bn Kirin. |
| **Made** | (n.x.nêr) 1 .Tiştê ko cihekî digirit û bariste(pîvan) hebit. Daring. Kereste. 2.Dirav. |
| **Madî** | (hk.dar.çewa) Mirovê pareperês. Çirîk. |
| **Maf** | (n.x.nêr) Darijtina deshelat di danin jibo welatîyan ko çi kar kiryar çelengî di karin bi ken û berevajî, çi nabe bi hêt kirin. Mafê axivtin, dengdan, jîyan, mafê çarenivîs û htd. Brx Erk. |
| **Mafnas** | (kar,n.dar.dz) Pispor di warê zanîna maf da. |
| **Mafzan** | (kar,n.dar.dz) Mafnas. |
| **Mahîn** | (n.x.mê) candar Nivşê mê yê hespan. Mehîn. |
| **Mak** | (n.x.mê) Tuxmê giyandarên gehiştf yên mê. Dayk. :Maka; çtiçikan. Maka têjikan. |
| **Makder** | (n.dar.mê) rêvnan Jêder. Çavkanî. |
| **Maker** | (n.I.mê) candar Tuxmê mê yê keran. Kera mê.Pend :Maker li ber çavêd kerî xatûne. |
| **Makîne** | (n.x.mê) Amêrên bi hêza kareb, gaz, panzîn û htd kar di kin.: Makîna; cilşoştinê, cildirûnê, tirombêlê, hêranê, nivîsandinê û htd. |
| **Mal** | (n.x.mê) 1. Xanî yan cihê jîyana mirovî. .: Mala wan li cem mala meye. :MaIeka mezin. Pend :Malan barkir, jinti me xwe hişyarkir. Pend :Mala bê ser ya kavile.2. Tişt[pare , keltipel]ê mirvî. .Pend :MaIê dinyayê qirêja destane.Penrf :Mala zêran xira di be, mala mêran xirab nabe.Pend :MaIê bi tirê hatî, bi fîsê di çit. |
| **Malava** | (hk.I.çewa) Mirovê çavverkirî ii xanedan. Xwedî mal. |
| **Malavabûn** | (k.jn.gl.mê) Zengînbûn. |

| | |
|---|---|
| **Malavakirin** | (k.jn.gl.mê) Xwe zengînkirin. |
| **Malavayî** | (n.I.mê) Dema mirov kestikar yan heval û nasyaran bicih di hê lit. Xatirxastin. |
| **Malavayîkirin** | (k.jn.I.mê) Xatirxastin. Bicihhêlan. (K) bn: Kirin. |
| **Malaxwedê** | (n.I.mê) Malaxuda. Malaxudê. Mizgeft. |
| **Malbab** | (n.I.mê) Mala babê, bi taybet jibo keça mêrkirî dema serdana mala daybaban di ke; di bêjin çû malbabê. li malbaba xwe ma. |
| **Malbarkirin** | (k.jn.I.mê) Dema mirov mala xwe ji cihekî bar di ke bo cihê din. Pend: Malbarkirin malxirabkirine. (K) bn :Kirin. |
| **Malbat** | (n.dar.mê) Binemale. Xêzan. |
| **Malbav** | (n.I.mê) Malbab. |
| **MalbêçÎ** | (n.l.nêr) Malbiçtik. |
| **Malbiçûk** | (n.I.nêr) Cihê zaro (êmbiriyo) têda di zikê daykê da. Pizdan. |
| **Maldar** | (hk.dar.çewa) Mirovê şareza di warê rêvebirin û serederî ya malê da. Xanedan. |
| **Maldarî** | (n.l.mê) Xweşkirina rewşa aborî ya mala xwe. Xanedanî. |
| **Maldarîkirin** | (k.jn.l.mê) Rêvebirin ii pşdabirina rewşa jiyanê li malê. |
| **Malevîn** | (hk.dar.çewa) Mirovê desgirtî.Mirovê çirîk.Mirovê nemera. |
| **Malhol** | (n.l.mê) Jêrav. Solîne. |
| **Malinc** | (n.dar.nêr) Parçe asineke hilûye, hosta jibo çîmentokirin, gêckirin û teqinkirina dîwaran bi kar di hînin. |
| **Malinc** | |
| **Maliştin** | (k.jn.I.mê) Malîn. Gêzikdan. |
| **Malîn** | (k.in.x.mê) Paqijkirina mal, hewş bax ii htd, bi gêzikî. Gêzikdan. (K) bedn: ez di malim em di malîn, tu di malî hûn di malin, ew dimale[....it] ewan di malin.Pr :dê bi +bdn. Bdb : di malî, di malin.Db,dûr : malîbû, ...bûn. (F) : bi male bi malin. |
| **Malker** | (hk.dar.çewa) Yê xwe mandî di ket jibo başkirina rewşa xwe ya aborî. Rêncber. |
| **Malkirin** | (k.jn.I.mê) Karkirin jibo peydakirina dirav û pareyî. Pend :MaIê jibo kurê çak yan yê xirab neke. (K) bn: Kirin. |
| **Malmezin** | (hk.I.cewa) Mirovên zengîn û heyî. Xanedan. |
| **Malofî** | (rd.dar.çewa) Giyandarê hînî mirovî û nav malê di bit. Bizina,mîha malofî. |
| **Malper** | (n.l.mê) Berperek yan jorek vekirî jibo zanyarî li nûçeyan û danûstandinê di (Intemet) da. |
| **Malwêran** | (hn.l.çewa) Kesê mala wî wêran, çamek bi ser hatf. Malxirab. |
| **Malwêranbûn** | (k.jn.l.mê) Wêran- xirabbûna malê ji egera çamekê. (K) bn :Bûn. |
| **Malwêranî** | (n.l.mê) Derdeserî.Malxirabî. |
| **Malwêrankirin** | (k.jn.l.mê) Dema çamek di be egera wêranî û derdeserî ya malê. Pend :Mala xwe bi destê xwe wêran kir.ang ; yê bi xwe karên xwe têk di de. |
| **Malxirab** | (hk.l.çewa) Malwêran. |
| **Malxirabbûn** | (k.jn.l.mê) Malwêranbûn. |

| | |
|---|---|
| **Mabtirabî** | (n.l.mê) Malwêranî. |
| **Malxirabkirin** | (k.jn.l.mê) Malwêrankirin. |
| **Malxwê** | (n.l.dz) Xudanê malê. pend : Ger diz û malxwê bi bin êk dê gayî di kulekê ra bi bin. |
| **Mam** | (n.x.nêr) Birayê babê.: Wî keça mamê xwe ji xwe ra anî. |
| **Mama** | (nbiyan.x.mê) Dayk. Dadê. |
| **Mambiz** | (n.l.mê) Xezal. Mamiz. |
| **Mamend** | (n.x.nêr) Navê mêrane. |
| **Mamik 1** | (n.dar.nêr) Helametek di nav rez, zevî û bîstanan di çiklînin dako giyandar jê bi tirsin ti zîyanan nekin. Dalho. |
| **Mamik 2** | (n.dar.mê) Tiştîk. Têderxistinok ; mîna :derya şîne, av tê nîne. ang ; Keskan. |
| **Mamir** | (n.x.mê) Mirîşka yek salî û hêj hêk ne kirine. |
| **Mamirk** | (n,biçûk.dar.mê) Mamir. |
| **Mamiz** | (n.l.mê) Xezal.Mambiz. |
| **Mamo** | (gazn.dar.nê) Gazîkirina mamê.' |
| **Mamosta** | (karn.dar.dz) Pispor di karekî da. Seyda. Fêrvan.: Mamostayê zimanê kurdî. |
| **Mamostayî** | (kam.I.mê) Karê mamosta. karê wanegotinê. |
| **Man** | (k.jn.x.mê)l.Hebûna mirovî. 2.Gîrobûn. (K) bdn: ez di mînim em di mînîn, tu di mînî hûn di mînin, ew di mîne[. . ..it] ewan di mînin. Pr: dê [bi] mînim, mînîn, mînî, mîne[mînit] Bdb: ez di mam, em di mayn, tu di may, hiin ewan di man , ew di ma. Db,dûr : ez mabûm,em mabiiyn, tu mabûy, hîin mabûn, ew mabû,ewan mabûn . (F): bi mîne bi mînin. |
| **Mandel** | (hn.x.çewa) Direw. Şaş. Nerêk. |
| **Mandelkirin** | (k.jn.I.mê) Direw derêxistina gotin yan kiryarekê. |
| **Mandî** | (hk.x.çewa) Westayî. Westiyay. : Ez evro gelek ê mandî me.Pend: Destê mandî liser zikê têre. Ang; yê kar û zehmetê bi ke, dê jiyana xwe xweş bi ke. |
| **Mandîbûn** | (k.jn.I.mê) Westan. Westiyan. (K) bn: Bûn. |
| **Mandîkirin** | (k.jn.I.mê) Westandin. : Tu xudê xwe wesa mandî neke. (K) bn: Kirin. |
| **Mang 1** | (n.x.mê) Heyv. |
| **Mang 2** | (demn.mê) Meh. |
| **Manga** | (n.dar.mê) Çêl.Çêlek. |
| **Mangirtin** | (k.jn.I.mê) Girevgirtin. (K) bn :Girtin. |
| **Mango** | (n,hiyan) fsqî Core fêqîyeke, girovir yan hêkî ye, mezin tam şirîne. |
| **Manşêt** | (n.biyan.mê) Serntiçe. Bijkoj. |
| **Mar** | (n.x.nêr) adt Giyadarek xişok,dirêj û bê pêye jehirdare[bi jehire]. Pend :Marê bin gelgeleyî. Ang; mirovê binvebinve.Pe«rf:Mar nabit yar. Pend :marê zikê wî hate rêya wî. |
| **Maravî** | (n.I.nêr) candar Marê di avê da di jît, yan melevan. Marê avî. |
| **Mardîn** | (hk.cih,bajn.x.m) Bajareke li Kurdistana Baktir. Mêrdîn. |
| **Marekirin** | (k.jn.I.mê) Markirin. |

| | |
|---|---|
| **Margestin** | (k.jn.I.mê) Dema mar bi mirov yan giyandarekî ve di dit yan gez di kit. Marpêvedan. |
| **Margestî** | (hk.I.çewa) Yê marî pêvedayî yan leq lêdayî. Pend:Margesti ji werîsî ditirsit.ang; jiber tirsa wî ji marî, werîs li ber çavan di bit mar. kesê bi serî hatî û çavtirsayî. |
| **Margiros** | (n.dar.nêr) tewai Nêrekew. Rubad. |
| **Margîse** | (n.dar.nêr) candar Giyandarek xişok û biçiike , dest û pê hene. |
| **Margîsk** | (n.dar.nêr) candar Margîse. |
| **Markirin** | (k.jn.mê) Girêbenda navbera jin ti mêran li cem mela yan oldarekî ve, yan jî li dadgehê. . Jin markirin ; jinînan. (K): bn :Kirin |
| **Marmark** | (n.I.mê) candar kirimtk Corek kirmên zirav û biçûkin di zikê mirovî daû di nav desnivêjê diyar di bin. |
| **Marmasî** | (n.I.mê) candar Corek masîyên dirêje mîna marane. |
| **Masî** | (n.x.mê) candar Giyandarek xwînsar û avîye, hindek hêkkerin lirndek di zên, gelek cor û reng hene.Pend :Masîyan di avê da di firoşit.Penrf :Masîy^^ a çeman, nabe nehinga deryayan.Penrf :Masî li dêmî najît. |
| **Masîgir** | (pîşn.l.dz) Ravker yan nêçîrvanên masîyan. Şokvan. |
| **Masîgirî** | (kam.dar.mê) Rava masîyan. |
| **Mast** | (n.x.nêr) sptyatî Xwarineka rêçalî ye , ji şîrê gerimkirî çiştî hêvênkirinê çend demjimêran di hêt nixavtin, di mehit u jibo xwarinê berhev di bit. |
| **Mastfiroş** | (pîşn.l.dz) Kesê karê firotina mastî di ke. |
| **Mastfîroşî** | (kkarn.dar.mê) Mastfîrotin. |
| **Masûlke** | (n.x.mê) can camiarî Goştê bi hêz û peyt yê leşê candarû mirovî ko mirov di karit bi livînit. |
| **Maş** | (n.x.mê) gtya Giyayekê çandinî ye berê wî wek dindikane, bi tinê yan digel xwarinên din tê berhev kirin. Pend: Te da nav maşan. ang; dema mirov gotineka keç di bêjit, hemberê mirovî jibo hişyarkirinê vê gotinê di bêjit. |
| **Mat** | (n.x.mê) Tebel. |
| **Matanê** | (n.dar.mê) lîztin Tebelanê. |
| **Matanêkirin** | (k.jn.I.mê) yarî Tebelanêkirin. |
| **Matêker** | (hk.dar.çewa) Mirovê mayê xwe di hemti karan da di ke.Davdoz. |
| **Matîkirin** | (k.jn.dar.mê) Çavdêrîkirin. Xwedîkirin. Matî jê kirin. Mati ji zarokan di ke.(K) bn: Kirin. |
| **Maytêkirin** | (k.jn.dar.mê) Dest di karên xelikî werdan. : Tu mayê xwe di karê min da neke. Ang; te şolejê nîne.(K) bn: Kirin. |
| **Mazî** | (n.x.mê) darabar Dareke belg kesik û xemildare, li çiyayên Kurdistanê pirin, du corên berî di det wek; mzî bo derman û tamdana kevlan mifa jê di hêt wergirtin, û berî, ku di bêjinê berîmazik. |
| **Mazîçin** | (kar,n.l.dz) 1. Kesê ku li çiyan li mazîyan di gerit di çinit. 2. Navê jin û mêrane. |
| **Mazû** | (n.x.mê) Mazî. |
| **Mazûvan** | (kam.dar.dz) Mazîçin. |

| | |
|---|---|
| **Me** | (cihn) rêzman Kcsê yekê piranî, heyîn . :Kurdistan welatê (me) ye. : Stiranekê bo me bêje.:MaIa me. Em. Me divêt gelê kurd serferaz bit. : Wek me bivê dê wesa bi be. |
| **Mebest** | (n.x.mê) Şirovekirina gotina mirovî di vêt bêjit bo hemberê xwe.Ya dilê mirovî. Merem.:Mebesta te ji wê gotinê çiye?. |
| **Mecûşî** | (dîn,n) Kevine oleka îranî yane. |
| **Meger** | (pêrb) rêzman Alavekejibojêgirtin, cudakirinê Jibilî. Eger ne. |
| **Meh** | (hk.dem,n.x.mê) l.Sîh roj. Sê meh werzekî pêk di hînin.Sal duwazde mehin. :Meha gulanê. Meha xizîranê. :Eve meheke min cigare hêlane.Heyv. |
| **Mehandin** | (k.jn.x.mê) Lêkirina hêvênê taybet li şîrî, paş çend demhijmêran tîr di bit û mast, yan penîr jibo xwarin berhev di bit.2.Tîrbtin. :(K) bdn: ez di mehînin em di mehînîn, tu di mehînî hûn di mehînin, ew di mehîne[...it] ewan di mehînin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : di mehand, di mehandin.Db,dûr: mehandibû, ...bûn. (F): bi mehîne , bi mehînin. |
| **Mehane** | (hk.dar.çewa) Karê li mehê carek di hêt kirin. : Ez mehane mehyana xwe di wergirim. |
| **Mehanî** | (n.dar.mê) bn: Mehyane. |
| **Mehbirin** | (k.jn..l.mê) Her ji 20 rojên destpêka avisbûnê ta meha çarê,jin gêj di bin û di verişin. Pend : Ya ne bit meha, bila bînit deha.ang ; mehbirinji bûna zarokan girantire jibo jinan. (K) bn: Birin |
| **Mehik** | (n.dar.mê) Rojê nivêj û nizayê di hindek mehan da. |
| **Mehir** | (n.x.mê) Mehira jinê. |
| **Mehirkirin** | (k.jn.l.mê) Markirina jin û mêran li cem mela, yan dadgehê. |
| **mehî** | (hk.dar.çewa) Mast, penîrê, hatî mehandin. Tîrbiiyî. : Xwîna |
| **Mehîn 1** | (k.jn.x.mê) Tîr yan xesyana madeyên şil. Wek mastê mêhî. Şîr di mehit di bit mast.<br>Mehîn (n.x.mê) candar bn :Mahîn. |
| **Mehol** | (n.x.nêr) Amêrekê mîna çakuçane, jibo şikênandina keviran bi kar di hînin. |
| **Mehsik** | (n.dar.mê) Perçeke ji qayîşî di xin di pêlavê da, li bin pêyî jibo peytkirinê. Binpê. |
| **Mehyane** | (n.dar.mê) Parê mehekê yê mirov werdigirit hember karî. Heyvane. Ratib. |
| **Mej** | (n.x.nêr) bn: Mejî. |
| **Mejî** | (nx.nêr) can 1 . candarî Madeyê di kulox, yan hestîyên mirov û giyandarn da heye.<br>Mejîyê serî. 2.Jîr. Aqil. :Ew mirovek hinde gemjoye dê bêjî mejî di serî da nîne. |
| **Mejîhisik** | (hn.I.çewa) Mirovê zû fêrî tiştî nabit , çi naçit di serî da. Tênegehiştî. Gemjo. |
| **Mekîne** | (n.x.mê) 1 . Amêrekê agirîye bo berdana(hilkirina) cigare yan karên din bi kar di hêt.<br>2. Matorên livîn û paldana tirobêlan û amêrên dî. Dînemo. |

| | |
|---|---|
| **Mekke** | (hk.cih,cugrir.n) Bajêreke li Erbistanê, rûgeha misilmanan lêye. |
| **Mela** | (kar,n.x.nêr) Zanayê ola (dîn)ê islamê. |
| **Melayî** | (hk.dar.çewa) Mirovên bi rêbaz ûnavê M. M Barzanî daxbar. Derwêşên rêçika serokê neteweyî û canî Barzanî. |
| **Melarî** | [melarya],(n.x.mê) derd Êşeke tayên sar û gerim di hînit mirovî, birêya leqên pêşîya di hêt veguhastin. Lerzeta. |
| **Melbend** | (hk.cih,n.x.mê) Bingeh. Komele. |
| **Mele 1** | (kam.x.nêr) Mela. |
| **Mele 2** | (n.x.mê) Melevanî. : Ez ne meleme. ang; melevanîyan nizanim. |
| **Melekirin** | (k.jn.l.mê) Mirov di zane di avê da mele bi ke.Melevanîkirin. (K) bn :Kirin. |
| **Melevan** | (hk.dar.çewa) Yê di karit di avêda bi hêt, bi çit , xwe niqo ket û bi ser avê bi kevit. Pend : Melevan di xeniqit. |
| **Melevanî** | (n.dar.mê) Serkevtin, niqobûn û hatinûçûn di avêda. |
| **Melevanîkirin** | (k.jn.I.mê) Melekirin.(K) bn: Kirin. |
| **Melexan** | (n.x.mê) Şalok. |
| **Melez** | (n.x.nêr) Mûyên çîrebizinan. Merez. |
| **Melêy** | (n.x.mê) Milhêb. |
| **Melhem** | (n.x.nêr) Milhem. |
| **Melhemkirin** | (k.jn.I.mê) Melhem danan ser birînan, yan kirin çavên kul. |
| **Melisîn** | (k.jn.x.mê) Dema balinde,mirîşk, werdek, kew, kevok û htd xwe liser hêlînê yan lîsî mit di kin.: Mirîşka pîrê lisr hêkan melisî ye. |
| **Melîl** | (hn.x.çewa) Mirovê damayî. Bêgêwil. Posîde.Dilşikesî. |
| **Melîlbûn** | (k.jn.I.mê) Dilşikestin. Bêgêwilbûn. |
| **Melîlî** | (n.dar.mê) Posîdeyî. Daman. |
| **Melîlkirin** | (k.jn.I.mê) Bêgêwilkirin. Dil şikandin. |
| **Melok** | (n.x.mê) Komeka qesela genim, ceh , nok û htd.. di kin gurz dako jibo hilgirtin û birina ser cuxînê desxweş bi bit. Gurz. |
| **Melûl** | (hn.x.çewa) Melîl. |
| **Melûlbûn** | (k.jn.l.mê) Posîdebûn. Daman. (K) bn: Bûn. |
| **Melûlî** | (n.dar.mê) Daman. Dilşikestîn. |
| **Melûlkirin** | (k.jn.I.mê) Bêgêwilkirin. Dilşikandin. (K) bn :Kirin. |
| **Mem 1** | (n.x.nêr) 1. Navê mêrane, 2. Qehremanê dastana mem û zînê. |
| **Mem 2** | (n.x.mê) can Sing, Çiçik.Memik. |
| **Memê** | (n.x.nêr) Navê mêrane. Mem. |
| **Memê alan** | (n.l.nêr) 1. Qehremanê dastana mem ê alan..<br>2.Dastaneka kurdî ye,çîroka du evîdarane li çizîra botan ,binavê dastana Memê-alan. |
| **Memik** | (n.x.nêr) can 1.Sing. Çiçikên jinan. Guhanên giyandaran.2. Mêjokek lastîke zarok di mêjin dako pê hawîş bi bin. 3. Amanek lûleyîye şîrî bo zarokan tê di kin. Pîlik. |
| **Memnûn** | (n.x.mê) Supas. |

| | |
|---|---|
| **Memûzîn** | (nl.mê) I . Dastana navadeng a mem û zîn. 2. Du evîdarin Mem û Zîn qehremanên dastanê. |
| **Mencel** | (n.x.mê) Qazana mezin ya bi dervan, bo gerimkirin û kelandina av û zadan bi kar di hînin. |
| **Mencelûk** | (n.dar.mê) Menceleka biçûk ya bi destik û bê dervane, bo şîr, mast û htd, bi kar di hêt. |
| **Mend** | (hk.x.çewa) Hêdî. Rawestayî. Ava rawestayî. Pend : Ji ava pêl ne tirse ji ya mend bi tirse. ;ang kesê bêdeng biveye. |
| **Mendehoş** | (hk.dar.çewa) Hicmeti. Hay ji xwe neman. Serxweş. Gêj. |
| **Mendehoşbûn** | (k.jn.gl.mê) Hay ji xwe neman. Hicmetîbûn. (K) bn: bûn. |
| **Mendehoşkirin** | (k.jn.gl.mê) Serxweşkirin. Guhişandin. (K) bn: kirin. |
| **Mendehoşman** | (k.jn.gl. mê) Hicmetî man. Ageh ji xwe neman. (K) bn: Man. |
| **Mendelî** | (hk.cih,bajarn) Bajêreke li Kurdistana îraqê. |
| **Menteşe** | (n.x.mê) Corek stovankên zêr yan zîv jin di xin stoyê xwe liser singî belav di be. |
| **Menzel** | (n.x.mê) Mezel. Jûr. Eywan. |
| **Meram** | (n.x.mê) Mebest. Merem. |
| **Mer** | (n.x.mê) Amêreke jibo kolana rez û bîstanan bi kar di hêt, destikek heye, bi pêyan liser metirka di di givêşin di erdî da di çit. |
| **Merbêr** | (n.l.mê) Amêreke, devekê pan û qûr heye, jibo ax havêtin û erd koIanê mifa jê di hêt wergirtin.Pend :Merbêr di cewalan da nahêt veşarin. |
| **Merc** | (n.x.nêr) Nirxandina mirovê kanê dê krit kar û erkekî encam bi det. Mercên endamîyê,. . . ango çi di karit bi kit yan şîyan çine. : Ez dê qelemê xo demef te, bi mercekî tu sube bo min bi vegerînî. |
| **Mercê** | (n.dar.mê) Navekê jinan ê kevine. |
| **Merd** | (hn.x.çewa) Kesê nandeh û cavvekirî. :Ew mirovekê |
| | merde.Pend: Malê qels û merdî wek êk di çit. Pend :Merd be û ne tirse, li malan bixo û ne pirse. |
| **Merdan** | (n.x.nê) I.Meholk. Çakuç.2. Merd. 3. Navê mêrene. |
| **Merdane** | (hn.x.çewa) Mêranî. |
| **Merdbûn** | (k.jn.I.mê) Mirov fêrî mêvandarî nandehî yê di be. : Dumahîya temenê xwe ew yê merd bûy. Seyda berê ji vêgavê merd tir bû. |
| **Merdejin** | (hk.I.çewa) Jina merd, nandeh û çavvekirî. |
| **Merdemêr** | (hk.I.çewa) Mêrê merd, nandehçavvekirî. |
| **Merdî** | (n.dar.mê) Merdînî. |
| **Merdînî** | (n.dar.mê) Nandehî. : Bi merdî jiya û bi merdînî mir. |
| **Merdkirin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov bi mal û diravî jibo mêvanan ya pêdivî bi ket. : Divê jibo mêhvanan mirov xwe merd bi ke. |
| **Merem** | (n.x.mê) Mebest. |
| **Mereq** | (n.x.mê) Hez. Vîyan. Daxaz. Xewin. |
| **Mereqe** | (n.x.mê) .Danê req di gel xwarina şil têkel di ken. Birinc yan savar ê di xin nav nîskê. |

| | |
|---|---|
| **Merez** | (n.x.mê) 1.Mûyên bizinên çîr.2. Keça porzer. |
| **Merg** | (n.x.nêr) 1. Can. 2. Mirin. |
| **Mergever** | (hk.cih,dever.n.dar) Navê deverekêye. |
| **Mergonek** | (n.dar.nêr) Bagurdan. |
| **Merhem** | (n.dar.mê) Dermanekê nîv reqe, jibo birîn û çavkulîyê bi kar di hêt. |
| **Meriv** | (n.x.nêr) Mirov. |
| **Mermer** | (n.dar.nêr) Helanek ciwan û rengîne, dîwar û binê xanîyan pê di nexşînin. |
| **Merov** | (n.x.nêr) Mirov. |
| **Merş** | (n.x.mê) Mêzer. Mafîr.Rayex. |
| **Mertal** | (n.x.mê) Metal. |
| **Mesaj** | (n.biya.x) Leş perixandin. |
| **Mesîh** | (n.biyanx.nê) Pêxember îsa, s.x.l. |
| **Mesîhî** | (dînn.bawer) Fele. |
| **Mesîn** | (n.x.nêr) Amanekê avê ye destikek û lûlîyek pêve ye, bo şoştina serûçavan, desnivêjgirtinê yan avdana baxan. |
| **Mest** | (hn.x.çewa) Serxweş. Evîndar. Dêvane. Gêj. |
| **Mestbûn** | (k.jn.I.mê) Serxweşbûn. Gêjbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Mestkirin** | (k.jn.I.mê) Serxweşkirin. Dînkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Meşk** | (n.x.mê) Pîstê kewalan paş çêkirinê mastî û avê tê di xin bi werîsekî di hilawîsin, çendekê di kîyên dako nîvişk û dew ji hev cuda bi bin. |
| **Meşkkivan** | (k.jn.I.mê) Şilqandina meşkê jibo bi dest ve îna dew û nîvişkî.(K) bn: Kiyan. |
| **Meşq** | (n.x.mê) Rahênanên leşî jibo mirov leş qayîm û peyt bi bit. :Meşqa leşkerî. Rahênan. |
| **Meşqdan** | (k.jn.l.mê) Fêrî rahênanan kirin. (K) bn: Dan. |
| **Meşqdayî** | (hk.I.çewa) Kesê, serbazê fêrî rahînanan bûye. :Ew serbazek meşdayî ye. |
| **Meşqkirin** | (k.jn.I.mê) Rêhînan kirin. (K) bn :Kirin. . |
| **Met** | (n.x.mê) Xuşka babê mirovî. Xweha bavê. |
| **Metal** | (n.x.mê) Amêrekê kevine, mîna sêlwanan e, ji hesinê tunde, şervanên berê di dan ber xwe jibo xwe paraztin ji tîr û şûrên dijminî. |
| **Metare** | (n.x.nê) Mitare. |
| **Metirke** | (n.x.mê) Darekê kune temet pêlavê yan piçek mezintire, di destikê merê ra di kin ta di gehit ser merê, mirov li dema kolanê(erd,rez û bax) pîyê xwe liser di danit pal di dit dako di erdî da bi çit xwarê. |
| **Metirsî** | (n.x.mê) Tirs.Bive. |
| **Metîn** | (hk.cih,cugir,n) 1 . Çiyayeke li Kurdistana îraqê. 2. Navê xortane. |
| **Metran** | (n.x.nêr) Zanayê dînê feleyan. |
| **Mewij** | (n.x.mê) Mêwî. |
| **Mewîj** | (n.x.mê) Mêwîj. |
| **Mexl** | (hk.cih,n.x.mê) Cihê bêhinvedana kewalan. : Mexela pezî. |
| **Mexelbûn** | (k.jn.l.mê) Xirvebûna kewalan û bêhinvedana wan li mexalê. : Pezê şivanî li bin darê yê mexel bûy. |

| | |
|---|---|
| **Mexelkirin** | (k.jn.I.mê) Bêhinvedan dane kewalan. : Bizinê xwe mexel ke û were da fîravînê bi xoyn. (K) bn :Kirin. |
| **Mey** | (n.x.mê) Vexwarina kiholî. |
| **Meyan 1** | (hn.x.mê) Mehîn. Mehan. |
| **Meyan 2** | (n.x.mê) Navê jinane. |
| **Meyandin** | (k.jn.x.mê) Mehandin. |
| **Meydan** | (n.x.mê) Qad. |
| **Meyger** | (karn.dar.dz) Kesê vexwarina meyê di de mêvanan. |
| **Meyizandin** | (k.jn.x.mê) Nêrîn. Berê xo danê.Temaşekirin. Bi meyizînin, di meyizand. |
| **Meyizîn** | (k.jn.x.mê) Temaşekirin. Nêrîn. Bi meyize. Di meyizin. |
| **Meyîn** | (k.jn.x.mê) Mehîn. |
| **Meymûn** | (n.x.dz) candar Giyandareke leşsivik û pelewane,li daristanan di jît. :Ew mêrekê hinde kirêtedê bêjî meymûne!. |
| **Meyxane** | (hk.cih.n.dar.mê) Cihê vexwarina meyê.Bare. : Du demjimêran li meyxanê ma. |
| **Meyzekirin** | (k.jn.I.mê) Meyizandin. (K) bn: Kirin. |
| **Mezar** | (n.x.nêr) Gora mirovên navdar û xwedênas.: Me serdana mezarê nemiran kir. |
| **Mezargeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê mezarê çak û navdaran. |
| **Mezaxtin** | (k.jn.x.mê) Perê mirov li kirîna xwarin kelûpelan di de. : Li vê mehê min 2000 dînar mezaxtin. (K) bdn: ez di mezêxim em di mezêxîn, tu di mezêxî hûn di mezêxin, ew di mezêxe[. . .it] ewan di mezêxin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di mezaxt, di mezaxtin. Db,dûr : mezaxtibû, bûn. (F) : bi mezêxe, bi mezêxin. |
| **Mezdek** | (n.x.nêr) dîrok Navê pêxemberekê kurdane. |
| **Mezel** | (n.x.mê) Ode. Eywan. |
| **Mezin** | (hn.x.çewa) 1 . Ne piçûk. Gewre. Qebe.Gir. 2. Navsalve çûyî. Jî dirêj. Kevin. Pend :Mezin bi bite pir, di ser ra derbaz nebe.ang ; rêzgirtin li mezinan. Pend :Mezinan çi bo biçûkan ne hêlaye.Pend :Mezinê aqil biçûk |
| **Mezinayî** | (n.dar.mê) Gewreyî. pilebilind. . : Meznayî jibo xwedê başe |
| **Mezinbûn** | (k.jn.I.mê) Geşbûn. Werarkirin. Girbûn. : Lawê Siwarî yê mezin bûy. (K) bn: Bûn. |
| **Mezinkirin** | (k.jn.I.mê) I . Xwedîkirina zarokan, candaran û htd tanî mezin di be. Gewrekirin. :Min zarok bi jarî mezin kirin. 2. Pêşvebirin. : Hevsîyê me gelek xwe mezin di ket, jiber hindê ez hez jê na kem. (K) bn: Kirin. |
| **Mê** | (hn.x.çewa) 1.rêzman Tuxmê, zayendê mê. 2. Candar û mirov ên |
| | mê. Dêhil, bizin, mirîşk,maker û htd, jin, keç, dayk, met û htd. |
| **Mêdek** | ( n.x.mê) Serhevîrk. Buxçik. |
| **Mêga** | (n.I.mê) candar Gaya mê.Manga, Çêl. |
| **Mêgank** | (n.I.mê) candar Golika mê. |
| **Mêhreban** | (hk.dar.mê) 1. Dilovan. Dilpak. : Jina mêhreban. :Mêrê mêhreban. 2. Navê jinane. |

| | |
|---|---|
| **Mêhvan** | (n.x.dz) Mêvan. |
| **Mêj** | (hn.x.çewa) Kevin. Berê. ji mêje. |
| **Mêjandin** | (k.jn.x.mê) Şîrdan zarokan, karikan. : Te karik mêjandîne ?. (K) bdn: ez di mêjînim, tu di mêjînî hûn di mêjînin, ew di mêjîne[. . .it] ewan di mêjînin.Pr:dêbi +bdn. Bdb: di mêjand, di mêjandin. Db,dûr: mêjandibû, mêjanndibûn. (F): bi mêjîne, bi mêjînin. |
| **Mêjmêjok** | (n.l.mê) Mêjok. |
| **Mêjo** | (n.x.mê) Dîrok. |
| **Mêjok** | (n.dar.mê) Tiştê bi devî di hêt mêjtin. Memik. |
| **Mêjonivîs** | (karn.l.dz) Dîrokvan. |
| **Mêjtin** | (k.jn.x.mê) Mirov yan giyandar, devê xwe di êxit tiştekî bi hilkêşit dako şilî yan dûkêl bi hêt di devî da. (K) bdn: ez di mêjim em di mêjîn, tu di mêjî hûn di mêjin, ew dimêje[....it]ewan di mêjin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : di mêjt, di mêjtin. Db,dûr : mêjtibû, ...bûn. (F) : bi mêje bi mêjin. |
| **Mêkew** | (n.I.mê) Kewa mê. |
| **Mêlak** | (n.x.mê) can Endamekê navxweyî yê leşê mirov yan giyandarane. Cerg. Ciger. |
| **Mêmê** | (n.x.mê) Navek kevnar yê jinane. |
| **Mênandin** | (k.jn.x.mê) Pêveçûn. Wekhevbûn.Bi mênîne, di mênînin,.. |
| **Mêr 1** | (n.x.nêr) 1. Tuxmê nêr. Zelam . Peya. : Pend : Mêrê liber emrê[ferman]a jinê, her yê li ber mirinê. Pend : Mêrê du jinan şwîtik kete pişt gunan. Pend :Mêrê bin destê jinê, yê başe jibo mirinê. Pend :Mêrê çav bi der, jina xwelîser. Pend :Mêr di revin, jin diravin.pend :Mêrê du jinan piştîn kevte pişt gunan. |
| **Mêr 2** | (hn.x.çewa) Zîrek. Çavnetirs. Qehreman. Pend : Mêr bi nanekê nabin nandar û bi darekî nabin navdar. Pend: Mêre, belê ji navda qulêre. Pend :Mêrê bê dujmin ne mêre. Pend :Mêr hene, Mêrkok jî hene. |
| **Mêranî** | (n.dar.mê) Gehremanî. Zîrekî. Çavnetirsî.: Mêranî ya pêşmergehan li cîhanê deng daye. |
| **Mêrçak** | (hk.I.çewa) Mêr. Mêrxaz. |
| **Mêrçakî** | (pesin,nl.mê) mêranî. |
| **Mêrdîn** | (hk,cihc.mê) Mardîn. |
| **Mêrg** | (hk.cih,n.x.mê) Cihek bi av, dar, giya û xemilî. Çîmen. Baxê xwezayî. |
| **Mêrgesor** | (baj,cugirn,cih.l) Bajêrkek Kurdistana başûre. |
| **Mêrgûcîmen** | mêr û çîmen (n.l.mê) 1 . Gulistan. 2. Navê bernamek dilvekere li K TV di hêt pêşkêş kirin. |
| **Mêrî** | (n.x.mê) can Giyandareke biçûke kuna xwe li bin axê dirist di kit hijmarek mezin bi hevre dijîn. Gêle.Pend :Wekî mêrîyên perdar lê hatin. Ang; ji hev dûr kevtin li helavbûn.Pend :Mêrîyên kunekêne û berîyêd darberîyekêne. |
| **Mêrîzerk** | (n.I.mê) can Corekê mêrî yên hûrikin û reng zerin. |
| **Mêrkirin** | (k.jn.l.mê) Şûkirin. : Berî sê salan Şehyanê mêr kirî ye. (K) bn: Kirin. |
| **Mêrkirî** | (hk.I.çewa) Jina şûkirî. Şûkirî. : Zozan jineka mêrkirî ye. |

| | |
|---|---|
| **Mêrkuj** | (hk.I.çewa) 1 . Yê ko mêran dikujit. Kujek.2. Jina har, dujwar. |
| **Mêkujî** | (n.l.mê) Karê êkî mêr kujtin bin.: Ew hertim basê mêjîya xwe di ke. |
| **Mêrû** | (n.x.mê) Mêrî. |
| **Mêrxas** | (hk,hn.I.çewa) Mêrxaz. Pend :Mêrxas ji zîndanan na tirsin, tirsonek ji bayê hinavên xwe di tirsin. |
| **Mêrxasî** | (n.I.mê) Mêrxazî. |
| **Mêrxaz** | (hk,hn.I.çewa). Mêr.Zîrek. Çavnetirs.Qehreman. |
| **Mêş** | (n.x.mê) candar Giyandarekê fîrinde, kirmijok û biçûke liser xwarin û tiştê gemar dijît. |
| **Mêşereşk** | |
| **Mêşahingivî** | (n.I.mê) candar Mêşhingiv. |
| **Mêşahingvînî** | (n.I.mê) candar Mêşhingiv. |
| **Mêşelok** | (n.dar.mê) candar Mêş. |
| **Mêşereşik** | (n.l.mê) candar Mêşa reşa nav malan. Mêş. |
| **Mêşhigiv** | (n.l.mê) candar Mêşa ko hingivî çê dikit, jehirdare.mêşa hingvîn. |
| **Mêşhingiv (mêşahingvînî)** | |
| **Mêşkuj** | (n.I.mê) Amêreke karebayî yan destî ye , jibo kujtina mêşan bi kar di hînin. |
| **Mêşxur** | (n.l.nêr) balinde Perindeyeke xwairina wî mêş û mêşhingive. Kulkulî. |
| **Mêtal** | (n.x.biyan) Kanza. |
| **Mêtin** | (k.jn.x.mê) Mêjtin. |
| **Mêtingeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê azar û êşandina xelkê.Zorxane. |
| **Mêtinkar** | (karn.I.dz) Xwînmêj. Zordar. |
| **Mêtûlke** | (n.x.pir) candar Rişk. |
| **Mêvan** | (n.x.dz) I. Kesê li malek bîyanî bi xwe, vexwe û bi nive. Pend :mêvan ji mêvanî ne xweşe, malxoyî ji her duyan. Pend:Mêvan xweşe şevekê. Pend :Mêvanê direwîn, di xot carek firavîn. 2. Navê mêrane. |
| **Mêvanbûn** | (k.jn.I.mê) Mirov li malekê yan cihekî di bit mêhvan. Bûnemêvan. |
| **Mêvandarî** | (n.dar.mê) Kar, rêz, berhevî û xizmeta jibo mêvanan di hêt encamdan. |
| **Mêvankirin** | (k.jn.I.mê) Dema mirov kesekî di mal da di hewînit. (K):bn Kirin. |
| **Mêvanperwer** | (hk.l.çewa) Mirovê gelek keyfa xwe bi mêvanan di hînit. |
| **Mêvanperwerî** | (n.I.mê) Rêzgirtin û xizmeta mêvanan. |
| **Mêvanxane** | (hk.cih,n.I.mê) Cihê hewandina mêvanan. Otêl. |
| **Mêvok** | (n.x.mê) Bijkoj. Pijkovk. |
| **Mêw** | (n.x.mê) dar Dara tirî. |
| **Mêwîj** | (n.x.mê) mita Tirîyê gehişti di hêt hişikkirin yan mizeytkirin û li miştaxan radixin ta hişik di bit . |
| **Mêwîjareş** | (n.I.mê) mita Ji tirîyê reş [reşmêw]çê di bit. |
| **Mêwîjazer** | (n.I.mê) mita Ji tirîye zerike. |
| **Mêwkîk** | (n.x.mê) giya Giyayek bi xemle li çîyayên Kurdistanê hişîn di bit. |
| **Mêze** | (n.x.mê) Depek raste liser pêpikan qayîm kirîye, xwarin, nivêsîn û htd liser di hêt danan û kirin. Teble. |

| | |
|---|---|
| **Mêzekirin** | (k.jn.l.mê) Berêxwedan. Nêrîn. Lênêrîn. Sehkirin.Meyzandin. (K) bn: Kirin. |
| **Mêzer** | (n.x.mê) Berik. Merş. Pend : Ev zere ji vê mêzerê kême. |
| **Mêzûpotamya** | (cugim.dar.mê) Navekê dîrokîye, ango;welatê navbera du çeman. Kurdistan |
| **Mi** | (cih.n) rêzman Min. : Birayê mi. Serê mi,. |
| **Miçandin** | (k.jn.x.mê) Girtin. Pêkdadan. Bestin. : Devê xwe bi miçîne. ang ; devê xwe dane serêk.(K) bdn : ez di miçînim em di miçînîn, tu di miçînî hûn di miçînin, ew di miçîne[..it] ewan di miçînin. Pr : dê bi + bdn. Bdb : di miçand, di miçandin. Db,dûr : miçandibû, ... bûn.(F) : bi miçîne, bi miçînin. |
| **Miçkirin** | (k.jn.l.mê) Çavniqandin. Çav lê niqandin. |
| **Mifa** | (n.x.mê) Kêrhatî.Baş. Bi biha. Sûd. :Mifayê xwarina fêqî jibo mirovî geleke |
| **Mifadar** | (hn.dar.çewa) Tişt, xwarin, vexwairn, kiryarên bi mifa. :Bazirganî karekê mifadare. |
| **Mih** | (n.x.mê) candar Giyandarek malî û şîrdere.Pez. Mîh. |
| **Mihabad** | (hk.cih,bajêrn.cugir) l.Bajêrekê Kurdistana rojhilate. Paytextê komara kurdî ya bi navê Mihabad bû. 2. Navê jinane. |
| **Mij** | (n.x.mê) Dema ewir di kevit ser erdî û dinya tarî di bit. Mûran. Mijê çîyayên girtîn. |
| **Mijad** | (n.x.mê) Mijar. |
| **Mijandin** | (k.jn.x.mê) Mêjandin. |
| **Mijane** | (n.x.nêr) Destedarekê qayîme, li dema kêlana zevîyan bi dewaran, cotyar bi destên xwe di girit da bi karit hincari wek wî bi vê rast ragirit û xîça wî rast derkevit. |
| **Mijang** | (n.x.pir) can Mijîlank. |
| **Mijar** | (n.x.mê) Navnîşana her karek yan nivîsekê. Babet. Civîna , me ji çend mijaran pêk hatîye ji wan diravî, çelengî, leşkerî û htd. |
| | 441 |
| **Mijbûn** | (k.jn.l.mê) Dema mij erdê di girit. Bûne mij. :Dinya mij ,me berpêd xwe ne di dîtin. |
| **Mijdar** | (hk.dem) I.Meha yazdehê.2. Bi mij. 3.Navê jin û mêrane. |
| **Mijde** | (n.x.mê) bn: Mizgîn. |
| **Mije** | (n.x.mê) Tam. |
| **Mijî** | (hk.dar.çewa) Rojek, şeveka bi mij. Mijdar. |
| **Mijîl** | (hk.x.çewa) Yê bi karekî ve xwe mijîl di kit. :Ez nikarim herim mal, çunkî yê mijîlim. :Tu niha mijîlê çiyî ? ango; çi kar dikî? |
| **Mijîlank** | (n.x.mê) Rêza mûyên liser herdu zîhên ser û binî yên çavan. Bijang.Mijang. Mûjank |
| **Mijîlahî** | (n.dar.mê) Mirov karekî di ket, di tiştekî bi xebitit. Xebitîn. Xwe ji bîrvekirin |
| **Mijîlkirin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov xwe yan yekî mijîl di kit. (K): bn :Kirin. |
| **Mijmije** | (n.l.mê) 1. Dara mijmijê . 2. Fêqîyek biharî ti pir xweşe rengê wê zere. Zerdil. |
| **Mijûl** | (hn.x.çewa) Mijîl. |

| | |
|---|---|
| **Mikare** | (n.x.nêr) Amêrekê asine bo kunkirin û renîna(tiraşîn) daran bi kar di hêt. Nikare. |
| **Mil** | (n.x.dz) 1 . can Herdu bilindî yên zendik pêve hatîn girêdan û ser di kevit navbera wan da. 2.Gir.Girik. :Seg li serê milê rawesta. |
| **Milanê** | (n.dar.mê) Corekê govenda kurdîye mirov milên xwe di din hev dema di leyzin. |
| **Milçemilç** | (n.dar.mê) Mirçemirç. |
| **Milet** | (n.x.nêr) Xelikê bi hevra bijît ti ziman û çanda xwe he bit. Gel. |
| **Milêb** | (n.x.mê) Milhêb. |
| **Milêv** | (n.x.mê) Milhêb. |
| **Milhem** | (n.x.nêr) Cirk. |
| **Milhêb** | (n.x.mê) Çengaleke du sê yan çar guhe, destikek dirêj pêveye jibo hilavêtin û dane bayê ya genim, ceh,nîsk ii htd dako dan û ka ji hev cuda bi bin. Cemik. Çarguh. |
| | 442 |
| **Milî** | (hn.x.çewa) Tiştê girêdayî miletekî bit, xwemalî wek ;govend yan cilkên milî. Gelêrî. |
| **Milk** | (n.x.nêr) Mal. Erd. Dirav. |
| **Milkirin** | (k.jn.I.mê) Liser milê xwe danan. Di milê xwe kirin. : daykê zarokê xwe li milê xwe kir. |
| **Milmilanê** | (n.l.mê) Hevrikîyek nerînî û bêkuta, mirov pêkolê di kit dako zutir ji hemberê xwe bi gehit armancekê, evca çi berpisyarî |
| | dako zutir ji hemberê xwe bi gehit armancekê, evca çi berpisyarî yan dirav bit |
| **Milok** | (n.dar.mê) Melok. |
| **Milyard** | (hii,n.çend) Hizar car milyon. |
| **Milyardêr** | (hn.l.çewa) Kesê parê wî milyardek yan pitir be. |
| **Milyon** | (hijn) Hizar car hizar. |
| **Milyonêr** | (hn.l.çewa) Mirovê parê wî milyonek yan pitir be. |
| **Min 1** | (cihn.tek) rêzman Kesê êkê. Hebûn. Min du kur û keçek hene. Min di vêt . Min di got. Min nîne. Mala min. Kurê min û htd |
| **Min 2** | (n.x.mê) Yekeya pîvana mita û tiştî ye êk min nêzî kîlo û nîv e.= 3500 gr. pend: Sivore û ber û minêd xwe. :Mineka pîvazan. :Mineka zerdilan |
| **Minal** | (n.x) Zarok. |
| **Mindal** | (n.x) Zarok. |
| **Minê** | (n.x.mê) Lava. Hîvî. |
| **Minêkar** | (hk.dar.çewa) Supasdar. : Eger tu vî karî bo min bi kî, ez dê ji te minêkar bim |
| **Minêkirin** | (k.jn.I.mê) Supaskirin. Hîvîkirin. Lavakirin. (K) bn : Kirin. |
| **Minminok 1** | (hk.dar.çewa) Mirovê kiryar û bizavên hêdî di ke. Nimnimok. Nerim. |
| **Minminok 2** | (n.dar.mê) candar Pelatînk. |
| **Miqawe** | (n.x.mê) Kaxezeka sitûre, ji kayê hatî diristkirin. Karton. |

| | |
|---|---|
| **Miqilk** | (n.x.mê) Axlewîk. |
| **Mirandin** | (k.jn.x.mê) I.Dema mirovek wek mirî bi hêt navnivîskirin. 2.Xwe bêdengkirin. Bêhoşkmn. Xwe mirandin (K) bdn: ez di mirînim em di mirînin tu di mirînî hûn di mirînin ew di mirînit ewan di mirînin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : di mirand di mirandin. Db,dûr : mirandibû, ... bûn. (F): bi mirîne bi di mirandin. Db,dûr : mirandibû, ... bûn. (F): bi mirîne bi mirînin |
| | 443 |
| **Mirar** | (hn.x.çewa) Kelexê giyandarê mirî. :Seyê mirar. -Kerê mirar |
| **Mirarbûn** | (k.jn.I.lm) Dema giyandarek di mirit. |
| **Mirarî** | (n. x.mê) l.Madek bihadare, di kin ristik bo ciwanîyê bi kar di hêt, nemaze li cem jinan. Dur.2. Navê pîrekane |
| **Miremir** | (n.dar.mê) deng Mirên. |
| **Miremirkirin** | (k.jn.gl.mê) Dengê miremirê jê hatin. :Panka hewe gelek miremirê di ke!. |
| **Mirên** | (n.x.mê) deng Dengê firokan, tirombêlan, ba û htd 'Mirêna trombêlan di hat. Virên. Hurên |
| **Mirin** | (k.jn.x.mê) Dema mirov canê xwe winda di kit. Çûn ber dilovanî ya xudê. Neman.Mirina wî ji egera nexweşîyê bû Pend :Mirina bi heval, çêtire ji jiyana bê heval (K) bdn- ez di mirim em di mirîn, tu di mirî hûn di mirin, ew di mire[ itl ewan di mirin. Pr : dê bi+ bdn. Bdb : ez di mirîm, em di mirîn tu di mirî hun di mirîn, ew di mirî ewan di mirîn. . Db,dûr : ez mirîbûm, em mirîbûn,tu mirîbûy,ew mirîbû, ewan mirîbûn (F) bi mire bi mirin. |
| **Mirî** | (hn.dar.çewa) Laş (leş) ê bêcan. Mirîyê xwe veşartin, binax kirin. .Pend :Mirî qon bi doşave. |
| **Mirîçok** | (hk.dar.çewa) Mirovê sist, xav, lewaz. |
| **Mirîd** | (kam.x.dz) Kesên tûbedar li ber destê şêx, xwedênasan û çakan Ii ser rêya wan herdem di xilwe û nizayan dane |
| **Mirîşk** | (n x.mê) perinde Baldarek malî û hêkkere.Pend :Mirîşk hêkan di ket, kelebang birîyan di ket |
| **Mirîşo** | (kam.I.dz) Mirovê ku mirîyan di şût. |
| **Mirmirk 1** | (n.dar.nêr) fêqî Corek tirîye reng sorê tarî yan reşe. Bêsîrane |
| **Mirmirk 2** | (n.dar.nêr) Pêşî. |
| **Mirov** | (n. x.dz) l.Giyandarekê jîre, sozdare. : pend :Mirovan mirov ne xwarîne.ang ; jibo mêvanan di hêt gotin dema daxaza vehewandinê ji xwedî yê malê di kin..Pend :Mirovê dîn di şahî û şînîyan da diyar di bin.Pend :Mirov di mirit, belê nav di mînit.2 Jîr. : Ez nizanim ev xorte dê kengî bit mirov. 3. Xizim. : Dayk û babên wî mirovên hevin. :Ew yê bê xwedî ye û tu mirov nînin.Pend :Mirov bi mirovê xwe mirove. |
| **Mirovanî** | (hn.dar.çewa) Girêdana mirovan bi hevra. Xizmanî. ji xûnekê. : Mirovanî ya wan ya kevine |
| **Mirovatî** | (hn.dar.çewa) Kar û kiryarên têkeilî bi alîkarîyên mirovî ve hebin. :Alîkarîyên mirovatî. |
| **Mirovayetî** | (n.dar.mê) Mirovatî. |

| | |
|---|---|
| **Mirovmirovkanê** | (hk.dar.çewa) Dema mirov tayê mirovê xwe di girit, liser rastî û şaşîyê[çewtî]. Tagirî. Cudayî |
| **Mirovmirovkanêkirin** | (k.jn.ggl.mê) Tagirîkirin. Cudayîkirin. |
| **Mirovî** | (hn.dar.çewa) Mirovayetî. |
| **Mirovxwer** | (hk.I.çewa) Di çîvanokan da pîrvevî ti serkirînk ko mirovan di xon |
| **Mirûz** | (n.x.mê) Mirît. Gêwil. |
| **Mirûztirş** | (hk.I.çewa) Mirîtşîn.Navçavgirê. |
| **Miryem** | (n.x.mê) 1 .Dayka Isa yê pêxembere (s.x) .2. Navê keçane. |
| **Mis** | (n.x.nêr) Kanzayek nerime , reng sorek tarî ye. |
| **Mishef** | (n.bivan) Kitêba pîroz. Qur'an. |
| **Mishefareş** | (n.I.mê) Kitêba pîroz ya dînê Êzdîyan. |
| **Misilman** | (hn.x.çewa) Mirovê ji ola îslamê. |
| **Misir** | (hk.cih,welatn.cugim) Mezintirîn welatê erebî ye. |
| **Misrî** | (nejn) I. Xelikê welatê Misir. 2. ziman, kelûpelên ji Misir ê. |
| **Misk** | (n.x.mê) Corek gulavê ye. Bêhin. |
| **Misoger** | (hk.x.çewa) Kar yan kiryara goman têda ne be. Sedased.:Serkevtin misogere. |
| **Misogerbûn** | (k.jn.l.mê) Gotin yan kiryara goman têda ne mînit û sedased bi bite cihê bawerîyê. |
| **Misogerî** | (n.dar.mê) Mirogerbûn. |
| | 445 |
| **Misogerkirin** | (kjn.l.mê) Serrastkirin. Piştrastkirin. :Here misoger ke kanê sube cejin e yan ne?.(K) bn: Kirin. |
| **Mist** | (n.x.mê) I . Destê mirovî yê miçandî. Buks. 2. Destê pir. :Misteka genimî, tovikan û htd. Girmik. Lep. |
| **Mişar** | (n.x.dz) 1 . Amêrek asinî ye didan tûje bo birîna daran bi kar di hêt.2 Malikên çarkujî yan alkêş [lakêşe] bo çandina mitayî wek pîvaz, sîr kixs û htd. |
| **Mişe** | (hk.x.çewa) Zehif, berfîreh. :Xwarin a mişeye. :Dar di mişene li Kurdistanê. Pir. |
| **Mişebûn** | (k.jn.I.mê) Pirbûn. Zafbûn.Zorbûn. : Giyanewer li Kurdistanê yêd mişe bûyn. |
| **Mişeyî** | (rd.dar.çewa) Berfîrehî. |
| **Mişekirin** | (k.jn.l.mê) Zehifkirin.Zorkirin. |
| **Mişexor** | (hk.I.çewa) Kirmijok. |
| **Mişk** | (n.x.nêr) candar Giyandarek şîrder ti biçûke bi ziyane di nav malan û liser xwarin û hevranan di jît. |
| **Mişt** | (hn.x.çewa) Pir. Tijî. |
| **Miştaxe** | (n.I.mê) Tirî ji mêwan di hêt kirin û li cihek hulî kirî û paqij, ûşîyan bi rex êkve radixin daku hişik bi bin û bibin mêwîj |
| **Miştbûn** | (k.jn.I.mê) Tijîbûn. |

| | |
|---|---|
| **Miştî** | (n.x.nêr) Alîka gîyandaran. Xwarina kewal û dewaran. |
| **Miştkirin** | (k.jn.I.mê) Pirkirin. Tijîkirin. |
| **Mit** | (hk,hn.x.çewa) Bêdeng. Kêmaxivtin. |
| **Mita** | (n.x.nêr) Hatîyê mirovî ji çandinê wek genim, ceh, nok, bacan, xiyar û htd. Berhem |
| **Mitare** | (n.x.nêr) Amaneke ji fafon yan plastîkê ye, avê bo vexwarinê tê di kin li aqaran yan nav zevî milkan ku av lê nebit Avdank |
| **Mitbûn** | (k.jn.l.mê) Bêdengbûn. Kirbûn. (K) bn :Bûn. |
| | 446 |
| **Mitî** | (n.dar.mê) Bêdengî. |
| **Mitkirin** | (k.jn.I.mê) Xwe mitkirin. Xwe bêdengkirin.Mitkirin.Bêdengkirin. Kirkirin. (K): bn Kirin |
| **Mivred** | (n.x.nêr) Amêreke ji hesinî hatîye çêkirin jibo hisan û xweşkirina devên das, bivir, sator û htd bi kar di hêt. Kartîk. |
| **Mixabin** | (pêrb) rêzman Alaveke jibo peşêmanîyê di hêt gotin. : Mixabin wî jinav me barkir. : Mixabin welatê me li bin destane : Mixabin ez nikarim alîkarîya te bi kim |
| **Miyaw** | (n.x.mê) deng Dengê kitkane(pişîk). Newnew. |
| **Miyawîn** | (k.jn.x.mê) Kitik dengê miyawê ji xwe di hînit.Miyawkirin. |
| **Miyawkirin** | (k.jn.I.mê) Miyawîn. Newkirin. Newîn. |
| **Miz** | (hk.x.çewa) Tama tirş û şirîn têkel (bi hevre). |
| **Mize** | (n.dar.mê) Xwarinên sivik di gel ereqê di xwen. |
| **Mizeyt** | (n.x.nêr) Roja tirî li avê dane, ko di kin mêwîj. |
| **Mizeytkirin** | (k.jn.I.mê) Tirî li zirikavê(ava zirik ê) dan,da bi bit mêwij. (K) bn: Kirin. |
| **Mizgeft** | (n.x.mê) Avahîyê xudaperistinê li cem misilmanan. Perisgeha misilmanan. |
| **Mizgîn** | (n.x.mê) 1 . Nûçeyek xweş, gotinek dilveker. 2. Navê mêr û jinane |
| **Mizgîndan** | (k.jn.I.mê) Gehandina nûçeyên xweş. : Ezê mizgînîyê bi dim te, kurdan mafê xwe wergirt. (K) bn : Dan |
| **Mizîrî** | (malbn) Navê hozeka kurdane, piranî ya xelkê wê li Kurdistana Iraqê xwe cihin. |
| **Mî** | (n.x.nêr) Davên pora serê mirovî û leşê giyandaran. :Mîyên bizinan. |
| **Mîç 1** | (n.x.nê) leş Kab. |
| **Mîç 2** | (hk.x.çewa) Vala. |
| **Mîçînk** | (n.dar.nêr) Amêrekê dutaye, mîna gazikan jibo derînana mûyan bi kar di hêt. |
| **Mîçkirin** | (k.jn.l.mê) Valakirin. Firkirina vexwarinan tanî çi di amanê têkirî nehêlin, piranî bo tirane bi kar di hêt. (K): bn :Kirin. |
| | 447 |
| **Mîdalî** | (n.biyanx.mê) Parçe asin yan plastîke wek ristik bi zincîr yan bendikekî ve girêdaye, pêşkêşî wan mirovan di ken yên kar yan çelengîyên bi biha encam dane, yan kesên zana û qehreman yan bendikekî ve girêdaye, |

| | |
|---|---|
| | pêşkêşî wan mirovan di ken yên kar Mîdalîya Barzanî , mîdalîy a şoreşa Eylûl, û htd? |
| **Mîdî** | (nejn) dîrok Kevine babkalkên kurdan li ser dema dewleta Mîdya. |
| **Mîdya** | (hk.cih,n.x.mê) dîrqk l.Kevine dewleta kurdane. 2. Navê keçan. |
| **Mîdyayî** | (nejn) Mîdî. |
| **Mîh** | (n.x.mê) candar Peza mê. Mih. Pez.Pend :Mirovek wek mîhê ye.ang; mirovekê nerim û liser xweye. |
| **Mîkrob** | (n.cîh.x.mê) Candarek hûrike, bi çavan nahêt dîtin. |
| **Mîl 1** | (n.x.nêr) Tîrka biçûk ya demhijmêrê. Her demjimêr ji sê mîlan pek dihêt,mîlê demjimêrê, . . . .xulgan,. . . . Çirkan |
| **Mîl 2** | (ncîhan)Yekeya cîhanî ya pîvana dirêjîyê. |
| **Mîna** | (hn.hk.x.çewa) Nimûne. Wek. |
| **Mînak** | (n.dar.mê) l.Nimûne. Risim.2. Bevil. ;Eve mînakê kê ye ?. |
| **Mînakkêşan** | (k.jn.I.mê) Kêşana wêneyan. Wênekirin. :Tu di karî ji min ra mînakekî bi kêşî ?. |
| **Mînakkirin** | (k.jn.l.mê) Mînakkêşan. Wênekirin. |
| **Mîr** | (karn.x.dz) Kesê rêveberîya deverekê dikit û li paytextî di rûnit. Mîrê amêdîyê, Botan, Hekarî, Baban û htd |
| **Mîran** | (n.x.dz) Navê kur û keçane. |
| **Mîrgeh** | (hk.cih,deven.I.mê) Dever yan cihê rêveberîya wê mîratî bit. Mîrgeha Botan . . .û htd. |
| **Mîranî** | (malb,n) Hozeka koçerên kurdane li Kurdistanê. Mîrî. |
| **Mîratî** | (kam.dar) Karê mîr pê ra di bit. :Çend salan mîratî li mîrgeha,... kirî ye. |
| **Mîrî** | (hn.x.çewa) I . Dezgeh, kar, mal, erd û htd, yên girêdayî desthelatê. 2. Mîranî. |
| **Mîrkut** | (n.I.nêr) Darek duserê sitûr û mezine, nîva wî ya simtî ye û destikek pêveye, jibo qutana savar û danî bi kar di hêt. |
| **Mîro** | (hd,gaz,dar.nêr) 1 . Alavek gazîkirinê bo rûmetgirtin, wek mîr .2. Navê mêrane. |
| **Mîrqut** | (n.I.nêr) bn: Mîrkut. |
| **Mîrxan** | (n.I.dz) 1. Mîr. 2.Navê kurane. |
| **Mîrxiçik** | (n.dar.mê) derd Corek pirsikên avdarin, li ser leşê mirovî nemaze zaroyan di hên |
| **Mîrza** | (malb.n) 1 . Kurê mîran. 2. Navê mêrane. |
| **Mîşekirin** | (k.jn.I.mê) Pakijkirina zevî û rezan ji dar ii beran dako giyayên din lê bi çînin.(K) bn: Kirin. :Zevîya bin gimdî hemî ya mîşe kirî, lê ya serî ya may. |
| **Mîx** | (n.x.mê) Bizmar. |
| **Mîxdan** | (k.jn.I.mê) Bizmardan. :Depî mîx de. |
| **Mîyaw** | (n.x.mê) Miyaw. |
| **Mîz** | (n.x.mê) Ava di leşê mirov li giyandaran da heye û bi rêya hedamê mîztinê derdikevit. |
| **Mîzdan** | (n.dar.mê) Cihê mîz lê xirve(kom) di bit. Pivdanka mîzê. |

| | |
|---|---|
| **Mîzî** | (n.x.mê) Cihê hedamê guhnelî yê giyandarên nêr têda di hêt veşartin, nemaze ga û nêrîyan. |
| **Mîzkirin** | (k.jn.l.mê) Mîztin. (K) bn: Kirin. |
| **Mîztin** | (k.jn.x.mê) Kiryara derkeftina mîzê ji leşî, di rêya hedamê mîztinê da. (K) bdn: ez di mîzim em di mîzîn, tu di mîzî hûn di mîzin, ew dimîze[...it] ewan di mîzin. Pr:dêbi + bdn. Bdb : di mîzt, di mîztin. Db,dûr : mîztibû, ...bûn. (F): bi mîze bi mîzin |
| **Mobayl** | (nbiyan.x.mê) Navek cîhanî. Têlefona mobayl; . . . bê girêdana hêlê . têlefona berîkê. |
| **Mor 1** | (hn.x.çewa) Renê sor û şîn têkel. Binevşî. |
| **Mor 2** | (n.x.mê) Amêrekê biçûke nav ii navnîşana mirovî yan ya cihê karê mirovî tê kolaye, li kaxezan di din wek îmza |
| **Moran** | (n.x.mê) Mij. :Bara pêtir di gel min di hê gotin. :Dinya mij û morane |
| **Morbûn** | (k.jn.l.mê) Dema rengê mor cihekî reng di ket. |
| **Morik** | (n.dar.mê) Parçeyên girovir ji şûşe yan plastîk hatine diristkirin, di simtîne wek ristik yan tizbî jê di hên çêkirin û hemereng û hemecorin |
| **Morî 1** | (n.x.mê) Morik. |
| **Morî 2** | (n.x.mê) Mêrî. |
| **Morîstan** | (n.dar.mê) Kunmêrî. |
| **Morkirin** | (k.jn.l.mê) Lêdana morê. îmzakirin. : Rêvebirî kamameya min mor kir |
| **Morkirî** | (hk.l.çewa) Kaxez, biryar ya mor lê hatî dan. |
| **Morlêdan** | (k.jn.l.mê) Morkirin. |
| **Moşek** | (n.x.mê) Topa mezin. Rokêt. |
| **Moxil** | (n.x.mê) Bêjinga hûr jibo parzinîna arî bi kar di hînin. |
| **Moz** | (n.x.mê) Stêng. |
| **Mû 1** | (n.x.nêr) l.MÎ. |
| **Mû 2** | (deng) Dengê orêna çêlekan. |
| **Mûç** | (hn.x.çewa) Tiştê bilind yan ji nav derdeftî.lêvên mûç, dirêj, bilind. Mirovek lêvmtiçe |
| **Mûçik** | (n.dar.nêr) Kaçikê mezin yê dewî. |
| **Mûçing** | (n.dar.nêr) Mûkêş. |
| **Mûçirk** | (n.dar.mê) Ji egera tirs yan sermayê lerzikek bi ser canê mirovî da derbaz di bit. Tezîlank |
| **Mûçkirin** | (k.jn.l.mê) Bilindkirina tişti, nemaze lêvan. :Wî lêvên xwe mûçkirin, dirêjkirin. (K) bn:Kirin. |
| **Mûjank** | (n.dar.piri) Mijîlank. |
| **Mûkês** | (n.l.nêr) Mîçînk. |
| **Mûm** | (n.x.mê) Keresteyekê şemaye yan bez, petîlkek pêveye agirî ber didinê bo ronahîyê yan bîranînan mifa jê di hêt wergirtin. Şemalk |
| **Mûmê** | (n.x.mê) Navek kevin ê jinane. |
| **Mûrîn** | (k.jn.x.mê) deng Dengê ga ii çêlan. |
| **Mûs** | (n.x.nêr) Devikê rihtiraşînê. Gwîzan. :Min bi miisê riha xwe kur kir. |

| | |
|---|---|
| **Mûsê rihtiraşînê** | |
| **Miisa** | (nx.nêr) Navê pêxemberê dînê cihoyan. (cîyan). |
| **Mûş** | (hk.cih,bajam) Bajarek Kurdistana başûre. |
| **Mûsî** | (malb.n) Xelikê Mûşê. |
| **Mûz** | (n.x.mê)ye?î Navê fêqîyek reng zer şêwe lûl, tam şirîn ê Efrikayî ye. |
| **Mûzexane** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê parastin nîşadana kelûpelên kevnar. |
| **Mûzîk** | (n,cihan.mê) mazîk Amêrên cuda  û hemereng ên lêda awazan. Tembûr, def, dehol, kemançe. |
| **Mûzîkjen** | (kam.l.dn) Mûzîkvan. |
| **Mûzîkvan** | (kam.dar.dz) Kesê awazên mûzîkê di jenit. |

# N

| | |
|---|---|
| **N** | (ne) Pîta hevdehê ji abeya kurdî. |
| **Na** | (pêrb) rêzman Alavê neyîkirinê. :Ez na çim, na xwem(xom), na hêm, Na hînîn, na bêje .. û htd. Ne. |
| **Nabe** | (pêrb.I) rêzman Alavê berbenkirinê, neyîkirin. Nabit. Çênabit. :Nabe tu herî mala wan. :Weha nebe. BRxDibe. |
| **Nabit** | (pêrb) rêzman Alavê neyîkirin yan nehêlan. Qedexe. Çênabit. :Nabit tu cigaran bi kêşî. Br x Dibit. |
| **Nabîna** | (hk.I.cewa) Yê çavên wî di kore ii çi nabînin. Korayî. |
| **Nabînk** | (n.x.mê) Corekê tîrokane kurt, û sttire ji êk parçe yan du darên têkda pêkhatî ye jibo pankirina hevîrê nan, sawik û kadeyan bi kar di hêt. |
| **Naçar** | (hk.dar.çewa) Neçar. Bêgav. Bêrê. ;Ez naçarim di vêt bi çim mal !. |
| **Naçarbûn** | (k.jn.l.mê) Bêgavbiin. Bêrêbûn. |
| **Naçarî** | (n.l.mê) Bêrêyî. |
| **Naçarkirin** | (k.jn.l.mê) Neçarkirin. |
| **Nadan** | (hk.I.çewa) Nemerd. Ça-vteng. Çirîk.: Ew mirovek nadane, kes ji destê wî çakîyê na bîne. |
| **Nakokî** | (n.dar.mê) Yeknegirtin. Duberekî. Netebayî. :Nakokî keftîye navbera wan da. |
| **Nal** | (n.x.mê) Parçe asineke bi bizmaran li binê pêyê dewaran di din dako bi hên parastin li dema bi rêve çûn ii karî. Sol. |
| **Nalbend** | (pîşn.dar.dz) Kesê dewaran nal di kit. mirovê ku karê wî diristkirina nalane. şarezayê çêkirina nalên dewaran. Solbend. Pend :Nalbendî hesp nal di kir, kêvjaleyî pê xwe bilind di kir. |
| **Nalbendî** | (kam.dar.mê) Karê nalbendan. :Eve çende tu nalbendîyê di kî?. |
| **Nalenal** | (n.dar.mê) zêmar Dengê ax û ofê ji mirovê westayî yan nexweş di hêt. |
| **Nalenalkirin** | (k.jn.gl.mê) Dengê nalînê jê hatin: Zarokê me hinde yê nisaxe, yê nalenalê di ke. (K) bn :Kirin. |
| **Nalik** | (n.x.mê) Qebqebk. Şimik. |
| **Nalîk** | (n.x.mê) Doşek. Bincî. Binrex. |
| **Nalîn** | (k.jn.x.mê) l.Dema mirov ji egera nisaxî, westan, tengavî yê naîenalê dike. (K) bdn : ez di nalim em di nalîn, tu di nalî hûn di nalin, ew di nale[...it] ewan di nalin. Pr :dê bi + bdn. Bdb : di ez di nalîm, em di nalîn, tu, ew di nalî hûn, ewan di nalîn. Db,dûr: ez nalîbtim, em nalîbtiyn, tu nalîbtiy hûn nalîbûn, ew nalîbû ewan nalîbiin. (F) : bi nale, bi nalin.2. Navê keçane. |
| **Nalkirin** | (k.jn.l.mê) Nalbend pîyên dewaran bi nalan nal di ke. :NaIbendî hespê min nal kir. (K) bn : Kirin. |
| **Nalkirî** | (hk.dar.çewa) Dewarê ku hatfye nalkirin. Hêstir, hesp, kerê nalkiriî. |
| **Namdar** | (hn.dar.çewa) I. Navdar. Navdeng. 2.Navê xortane. |
| **Name** | (n.x.mê) Kaxeza nivîsî ku mirov ji hevalek yan nasekî ra bi şinit. :Nameyek ji birayê min gehişt destê min. |

| | |
|---|---|
| **Namenivîsîn** | (k.jn.l.mê) Nivêsîna nameyan. Kaxetek bi hêt nivîsan. |
| **Namerd** | (hk.l.çewa) Nemerd. |
| **Namerdî** | (n.l.mê) Nemerdî. Çirîkî. |
| **Namîlke** | (n.dar.mê) Balavoka ragehandin ii zanînan. |
| **Namûs[namîs]** | (n.x.mê) Tiştê herî pîroz li cem mirovî, wek welat, ax, jin, zaro ii htd. Şeref. |
| **Nan** | (n.x.nêr) Xwarineke ji arê genimî dihê diristkirin piştî hevîrkirinê li ser sêla gerim yan teniirê dihêt birajtin , gelek cor û şêwe hene ; wek nanê tenik yê sêlê, sewik, semiin,.. ii htd. :Nan digel hemii zadan dihêt xwarin. Pend :Nanê xwe bi bi we bi avê, mineta xeilî pavê(bi havê).;'enrf :Nanê garisî bi xot, tirêd pîlayî di ket. Pend :Nanê nekeran li tu deran nîne.Pend :Nanê serşorîyê bi din segan jî pê razî nahin.Pend :Nanjibo nanpêjan./'e/K/ :Nanê sêlêye, ne bere nepişte. |
| **Nancûcik** | (n.l.mê) giya Tolk. |
| **Nandank** | (n.dar.mê) Buxçik. Mêdek. Servîrk. îşkav. Pend :Nanî di xwe, nandankê di dirîne. |
| **Nandar** | (hk.dar.çewa) Nandeh. |
| **Nandeh** | (hk.dar.çewa) Mirovê qedirgir iû nanî di dit xelik û mêvanan. Merd.Pend :Nandeh be, qedir giran be. |
| **Nankor** | (hn,hk.I.çewa) Mirovê qencî ii çakî yê zii jibîr di kit. |
| **Nanpêj** | (pîşn.I.dz) Mirovê nanî çê di kit, di pêjit. |
| **Nanpêji 1** | (hk.cih,n.l.mê) Cihê nan lê dihêt diristicirin. Nanpêjî ya Azadî li kîrê ye?. |
| **Nanpêjî 2** | (kam.l.mê) Karê patin(pêjtin)a nanî. : Wî deh salan nanpêjî kirîye. |
| **Nanûxwê** | ( n.I.dz) Nanû xwê bingehê gişt zadane, lewra bûye ^ nîşana nirxandina mirovî. ango bi naniixwê, yan bê naniixwê ye. Wefa. BrxNankor. |
| **Nar 1** | (n.x.mê) Narîn. |
| **Nar 2** | (n.x.mê) ye?j Hinar. |
| **Narinc** | (n.x.mê) fêqî Pirteqal. |
| **Narinçî** | (hk,hn.dar.çewa) Rengê pirteqalî. Rengê hinarî. |
| **Narîn** | (hn.x.çewa) 1. Bejina ciwan li rêkiipêk. Biik. 2. Navê jinan. |
| **Nas** | (lm.x.çewa)Kesêmirovîcarekêdîtî, Hdefmirovîyênase , tiştê mirovî dîtî , mirov di nasit. Bemas. |
| **Nasandin** | (k.jn.x.mê) Mirov xwe yan mirovekî bi êkî bi de nasîn, nav kamav ên xwe di bêjitê. : Ez dê evro te bi rêvebirê me yê nûbi dim nasandin. (K) bdn: ez di nasînim em di nasînîn,tu di nasînî hûn di nasînin, ew di nasîne[. . .it] ewan di nasînin. Pr:dêbi +bdn. di nasand, di nasandin. Db,dtir :nasandibû,nasandibûn. (F) : bi nase, bi nasin. |
| **Nasîn** | (k.jn.x.mê) Naskirin. Zanîn. : Min nasîn di gel wî heye, ez wî di nasim; nas di kim. Nasîna me ji mêjeye.(K) bdn : ez di nasim em di nasîn, tu di nasî hûn di nasin, ew di nase[...it] ewan di nasin. Pr: dê bi +bdn;. Bdb : di nasî, di nasîn.Db,dûr : nasîbû, ... bûn. (F) : bi nase, bi nasin. |
| **Naskenan** | (n.l.mê) Nanek tenik bi rûn û sertîk ve di din û liser sêla gerim di qelînin tama wî pir xweşe. Dorika dondayî. |
| **Naskirin** | (k.jn.l.mê) Nasîn. :Ez te nas nakim. :Wê em nas di kirîn(K) bn :Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Naştin** | (k.jn.x.mê) Najtin. Veşarin. Binaxkirin. |
| **Nator** | (n.x.dz) Zêrevan. Nêrevan.Çavdêr. |
| **Natorîkirin** | (k.jn.I.mê) Çavdêrîkirin. Zêrevanîkirin. |
| **Natorvan** | (pîşn.dar.dz) Zêrevan. Nêrevan. |
| **Natorvanî** | (kam.dar.mê) Zêrevanî. Nêrevanî. |
| **Nav 1** | (n.x.nêr) Peyveke her mirov, giyandar yan tişt pê di hên nasîn û ji hev cudakirin. Navê te çîye?. Pend :Navekê giran ti warekê wêran. |
| **Nav 2** | (n.x.mê) Têda. Li. Li nav de. Li nav. Di nav. Liba : Nava gundê me kesê nexwendevan tune. : Xwezî noke Ferhad di nav me da ba. |
| **Navandin** | (k.jn.dar.mê) Navkirin. Nav lê kirin. :Te pizokê xwe navandîye ?. (K) bdn: ez di navînim em di navînîn, tu di navînî hûn di navînin, ew di navîne[. . .it] ewan di navînin. Pr :dêbi+bdn. Bdb : di navand, dinavandin. Db,dûr : navandibii, navandibtin. (F) : bi navîne, bi navînin. |
| **Navbend** | (hk.cih) Navber. |
| **Navbendî** | (n.dar.mê) Dûrî yan dirêjîya di navbera cihan da |
| **Navber** | (hk.cih) Cih yan tiştê di kevit di nîva du yan pitir cihan, deveran. : Sêmêl di kevit navbera Duhok ii Zaxo. |
| **Navbij** | (hk.dar.çewa) Berevan. |
| **Navbijî** | (n.dar.mê) Berevanî. :Karê min tinê navbijîye, ne matê kirine!. |
| **Navbijîkirin** | (k.jn.gl.mê) Berevanîkirin. Ji hev dane paş. (K) bn:Kirin. |
| **Navbijvan** | (kam.dar.dz) Berevan. Berevankar. |
| **Navbir** | (n.x.mê) Bêhinvedana kurt di nav dema karî da. :Em dê . piştî navbireka kurt dubare dest bi karê xwe bi kin. |
| **Navbirdan** | (k.jn.gl.mê) Bêhinvedana kurd : Jiber civînvan di mandîne, em dê navbirekê din civînê. (K) bn : Dan. |
| **Navçav** | (n.I.pir) can Navbera derdu çavan. |
| **Navcavk** | (n.l.mê) Core pîlekeke, ji zêr zîv yan kanza, jibo ciwanîyê di xin ser enîya zarokan, li nav çavan. |
| **Navçavgirê** | (hk.gl.çewa) Mirovê ne vekirî. Mirovê bi riiçikê wî yê girê, xuya ko yê toreye. Tingijî. Hêris. Miriitî. : Seydayê me yê nû gelekê navçavgirê ye. |
| **Navçavgirêbûn** | (k.in.gl.mê) Tingijîn. Duh te çi bii wisa navçavên te di girê bûn ?.(K) bn : Bûn. |
| **Navçavgirêkirin** | (k.jn.gl.mê) Tingijîn. Hêrisbiin.:Bapîrê min navçavên xwe wesa yên kirîne girê dê bêjî qey dûpişkan govenda xwe lê girêdaye. (K) bn : Kirin. |
| **Navçe** | (dever.cih.mê) Dever. :Navçeya Barzan. |
| **Navdan** | (k.jn.I.mê) I.Navdeng belavbiin. 2. Pesindan.Nav li xwe dan. |
| **Navdanan** | (k.jn.I.mê) Mirov navan liser zarok, candar yan tiştan di dane. : Te çi na danaye ser kurê xwe?. ang; Te navê wî kirî çi?. (K) bn: Danan. |
| **Navdar** | (hk,hn.dar.çewa) I. Binav. Bi riavdeng. :Mirovekê navdar. :Jineka navdar. Mêrekê navdar. 2.Navê xortane. |
| **Navdarbûn** | (k.jn.gl.mê) Bi navdeng kevtin. Navdengê, wê, wî, wan belavbiin. (K): Biin. |
| **Navdarî** | (n.dar.mê) Navdengî. Nasîn. :Min ji mêje navdarîya te bihîsîye. |

| | |
|---|---|
| **Navdarldrin** | (k.jn.gl.mê) Navdengkirin. : Babê wî di xwazit wî navdar bi ke, lê ew bi xwe ne wesa ye.(K) bn: Kirin. |
| **Navdeng** | (hk,hn.l.çewa) Mirovê geleg xelik wî di nasin. Bi karekî nlaavvddeennge. :Bi nav. |
| **Navdengbûn** | (k.jn.gl.mê) Navdarbûn. |
| **Navdengkevtin** | (k.jn.gl.mê) Navdarbûn. |
| **Navdêr** | (hk,hn.dar.dz) I .Navdar. 2.Navê xortane: |
| **Navdêrbûn** | (k.jn.gl.mê) Bi navdeng kevtin. : Navê te çiye, lawo?. : Serdar e; .. navdêrbî. |
| **Navdêrî** | (n.da.mê) Navdengî. |
| **Navdêrkirin** | (k.jn.gl.mê) Navdarkirin. |
| **Navend** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê kar û çelengî yên çandî, ramyarî, civakî lê di hên encamdan .Bingeh. Civat. Komele. |
| **Navendî** | (n.dar.mê) Navbijî. Berevanî. |
| **Naverast** | (hk.cih) Navîn. :Deryaya naverast. |
| **Naverok** | (n.I.mê) Pêkhatî. Mijar. Rengvedana her nivîs yan gotarekê. |
| **Navêş** | (hk.çewa) Hinavêş. Zikêş. Zikçûn. |
| **Navêşan** | (k.jn.l.mê) Jan ke-vtin nav hinavan.Hinavêşan. |
| **Navgir** | (n.l.mê) rêvnan Pirteke yan birgeheke di keve nava pey^'eka lêkdayî , wek hatinûçiin. pîta ii navgire. Navpirt. |
| **Navik** | (n.dar.mê) I .can Pişkek wek lûlekane di kevit nîva zikî, zarok yan tijikên giyandaran xwarinê bi rêya wê werdigirin, cihê wê di mînit paş mezinbtina candaran. 2.KaldIa mita yê wek kezwan, bahîv û htd. 3 .Nîva tiştî mîna; navka nêrgizê. |
| **Navîn** | (hk.cih,n) Tiştê di kevit nîva cihek, deverekê. :RojhiIata navîn .Naverast. Deryaya navîn. |
| **Navkirin** | (k.jn.I.mê) Nav danan ser.: Dê çi nav li kurê xwe bi kî?. :Kiça xwe bi dapîra wê navkirîye. (K) bn :Kirin. |
| **Navlêdan** | (k.jn.l.mê) Nav danan ser. Bi nav kirin. (K) bn :Dan. |
| **Navlêk** | (n.dar. mê) rêzman Nav ii devok taybet bi zimanî ve. Idyem. |
| **Navlêkirin** | (k.jn.I.mê) Navkirin. |
| **Navmal** | (n.I.mê) Alî malê ji nav da |
| **Navmalî** | (n.l.mê) Keltipel li pêdivîyên nav malê, wek, nivîn, aman, text û htd. . :NavamaIîya xwe rêkêxist. |
| **Navmil** | (n.l.pir) can Cihê di keve navbera herdu milan ji alê pişta mirovî. |
| **Navneteweyî** | (hk.l.çewa) Cîhanî. Gelemperî. :îngilîzî zimanekê navneteweyî ye. |
| **Navnîşan** | (n.I.mê) Nav ii navê cihê jiyana mirovî. navê welat, bajêr, yan gund, rendek, kolan ii hijmara xanî. :Navnîşana mm Kurdistan ,Duhok, taxê,... hijmara xanî,... |
| **Navpirt** | (n.I.mê) rêzman Pirteke di zimanê kurdî da di keye nîva peyvan. mîna ;parvekirin„ par ve kiim. ang; ve navpirte. |
| **Navpişt** | (n.I.mê) can Nîva piştê. |
| **Navqolinc** | (n.l.mê) can Nîva serî ya piştê. |
| **Navran** | (n.I.mê) can Cihê di kevit navbera du ranan. |

| | |
|---|---|
| **Navrêz** | (n.l.mê) niv'isîn Delîve yan vebira navbera rêzan. ^Na-vrêzan gelek mezin neke da kexez têra nivîsana te bi ke. |
| **Navro** | (n.I.mê) 1 .Nîvro. 2.Firavîn. |
| **Navroi** | (n.I.mê) Nîvroj . Firavîn. :Navroja xwe baş. |
| **Navronk** | (n.l.mê) Delîve. Delav. Derav. Pêl. |
| **Navsal** | (hk.I.çewa) Jîyê dirêj . Kevin.. Bi temen. Mirovek bi navsalveçtiyî ye ; ... mirovek pîr. |
| **Navsalveçûn** | (k.jn.gl.mê) Pîrbiin. Jî dirêj biin. : Ew zelamekê navsalveçiiye.(K) bn :Çiin. |
| **Navşer** | (n.I.mê) Zozan. Feraşîn.:Havînan keçer di herin Navser. |
| **Navteng** | (n.I.mê) Bejina mirovî. Kêlek . Bejin. Navtenga wê zirave, ciwane.. |
| **Navtengzirav** | (hk.çewal) bejinzirav. |
| **Navûnîşan** | (n.I.mê) Navnîşan. |
| **Navûdeng** | (n.I.nêr) Navdeng. |
| **Navxo** | (hk.cih) Di nava,.. di nav da. Naxoya wewat.ang ; li welatf. Brx Derve. |
| **Navoyî** | (hk.I.çewa) Karekê peywendî bi navxo ve heye. :Pevçûnên navxoyî. |
| **Navxwe** | (hk.cih) Navxo. |
| **Navzed** | (n.dar.dz) Berbijar. Berendam. |
| **Navzedkirin** | (k.jn.gl.mê) Kesê di hêt desnîşankirin jibo berbijarîyê:Ew jibo civata bajêvanîyê hatîye navzedkirin.(K) bn:Kirin. |
| **Navzik** | (n.I.mê) Alîyê zikê mirov û candaran di nav da. : Endamên di kevin nav zikî da. |
| **Nawis** | (n.x.mê) l.Şikeftok. 2. Bindav. |
| **Nay** | (n.x.mê) mazîk Amêrekê pifkirinê ê miizîkê ye. |
| **Naylon** | (n.x.nêr) Corek taybet ê peroyane, tenik ii hiltiye, agir zii di girit. Plastîk. Nalyon. |
| **Naz** | (n.x.mê) Nazdarî. |
| **Nazandin** | (k.jn.mê) Deybab zaroyan nazdar di kin. Mirov candaran di nazînin, nazdar di ken.(K) bdn : ez di nazînim em di nazînîn, tu di nazînî htin di nazînin, ew di nazîne[..it] ewan di nazînin. Pr:dêbi +bdn. Bdb : di nazand, di nazandin. Db,diir:nazandibti, nazandibûn.(F):bi nazîne, bi nazînin. |
| **Nazdar** | (hk,hn.dar.çewa) 1. Mirovê xwe di ber kawdan ti peyvên ne xweş negirit. Brx Qayîm.2. Navê jinane. |
| **Nazenîn** | (hn.dar.çewa) I .Nazdarkirî. Xweşdivî. 2. Navê jinane. |
| **Nazê** | (hd,gazn.mê) Navê gazîkirinê, jibo kiç yan jina bi naz yan nazdar navkirî. |
| **Nazhewîn** | (hn.dar.çewa) Keyfxweş. Rtixoş. |
| **Nazî** | (n.x.mê) Naz. |
| **Nazîn** | (k.jn.x.mê) Nakirin. (K) bdn: ez di nazim em di nazîn, tu di nazî hûn di nazin, ew di naze[. . .it] ewan di nazin.Pr:dêbi +bdn. Bdb: di ez di nazîm em di nazîn, tu di nazî htin di nazîn, ew di nazî ewan di nazîn. Db,diir: ez nazîbiin, em nazîbûn, tu nazîbtiy hûn, ewan nazîbûn. Ew nazîbii. (F): bi naze, bi nazîn. |
| **Nazkenan** | (n.I.mê) Naskenan. |
| **Nazkirin** | (k.jnnl.mê) Mirovê nazan di kit, xwe naz di kit.(K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Naznazok** | (n.dar.mê) gui Corekê gulane gelek di nazikin, dema germê di çirmisin û li hînkatî geş di bin. |
| **Ne** | (pêrb) rêvnan Alavckc jibo neyîkirinê bi kar di hêt. Na. Nexêr. No. : Babê min ne li male. :We ne ke.Pend :Neçe cihê te çi kesê xwe lê ne bit. Pend :Ne vîyane ne dîtin dermane. Pend :Ne tu bî û ne ew karê te kirî. Pend :Ne gundê bêz, ne ktinê bê pez, ne mêrê di bêjit ez ii ez. |
| **Neban** | (hk.dar.çewa) Yê hinde tiştan na pejirînit, nemaze kewalên mê, dema kar yan berxê xwe wernagirit û nahêlit şîrê wê bi xot. : Bizina neban. |
| **Nebez** | (hk,hn.l.çewa) 1.Nerev.2. Navê mêrane. |
| **Nebijûn** | (hn.l.çewa) Ne paqij. Gêmar. Pîs. |
| **Nebînok** | (hn.l.çewa) Mirov yan tiştê ne diyar, neberçav. Berze. |
| **Nebûn** | (n.l.mê) Neman. Neyî.Ne berherhev. Tune. Tunebûn. Brx Hebûn. |
| **Necimîn** | (k.jn.x.mê) Mirov yan candar li çûnê di lengin. (K) bdn: ez di nicimim em di nicimîn, tu di nicimî hûn di nicimin, ew di nicime[..it] ewan di nicimin. Pr: dê bi+bdn. Bdb : ez di nicimîm, tu, ew di nicimî, em hûn ewan di nicimîn.Db,dûr :ez nicimîbûm em necimîbûyn, tu necimîbûy hûn, ewan necimîbûn, ew necimîbû. (F) bi nicime, bi nicimin. |
| **Neçar** | (hn.l.çewa) Bêgav. Bêrê. : Ez neçarim li mal bi mînim. |
| **Neçarbûn** | (k.jn.l.mê) Bêgavbûn. :Ya neçar bû ,heger wesa ne di kir. (K) bn : Bûn. |
| **Naçarî** | (n.dar.mê) Bêrêyî. : Ji neçarî ew paleyîyê di ket. |
| **Neçarkirin** | (k.jn.l.mê) Bêgavkirin. Bêrêkirin.(K) bn: Kirin. |
| **Neçê** | (hk.dar.çewa) Xirab. Nebaş. ;Zelamê neçê. Jina neçê. Brx Çê. |
| **Nediyar** | (hk.l.çewa) 1. Berze. Hinda. Winda.2. Navê xor û keçane. |
| **Nedîtbar** | (hn.l.çewa) Nabînok. |
| **Nedîtî** | (hk.l.çewa) Mirovê dinya nedîtî. Çavtarî.Pend :Nedîtî çi ne di dît, dema dît bi xwe ve rît. |
| **Nefel** | (n.x.mê) giya Giyayekê bi xemil û keske.2. Navê keçane. |
| **Nefer** | (n.x.dz) Kes,mirov : Pasa 30 neferî. Neferên firokê 180 e. tirombêla min pênc neferî ye. |
| **Neferhigir** | (n.l.mê) Amêrên hilgirtin û veguztina neferan. :Firokeya neferhigir. :Basa neferhilgir. |
| **Neferma** | (hk.l.çewa) Dezgeha ne fermî. Sivîl. |
| **Nefret** | (n.x.mê) Nizaya ne çak li kesekê mirovî nevêt. Nifrîn. |
| **Nefretkirin** | (k.jn.l.mê) Nifrînên xira lê kirin. (K) :Kirin. |
| **Neft** | (n.x.mê) Keresteyeke hemû corên sotinê jê çê di bin. Zêrê reş. Pitrol. |
| **Neftî** | (hk.dar.çewa) Rengê şînê tarî. |
| **Neguhêzbar** | (hk.l.çewa) Dorpêçkirî. |
| **Neh** | (hijn.çend) Hijmar 9. 4+5=9. 10-1=9. |
| **Nehan** | (hij.n) Hijmara nehê.Jêgirtina nehê. : Roja nehan; roja nehê. |
| **Nehatî** | (hk.dar.çewa) Bêber, Bêberhem. :Saleka nehatî ye, bê ber û bê barîn. |
| **Nehem** | (hijn.çend) Ya-yê-yên nehê. |
| **Nehemhev** | (hk.l.çewa) Nehevgirtî. Berela. Belav. |
| **Nehemîn** | (hijn.çend) Nehê. |

| | |
|---|---|
| **Nehevijî** | (hk.dar.çewa) Çepel. Lewçe. |
| **Nehê** | (hijn.çend.rêz) Ya,yê, yêd nehê. Tiştê hatî hijmartin ta jimare9, bi hijmara 9 bi dawî di hêt. Nehem. |
| **Nehhizar** | (hijn.l) Hijmara 9,000. |
| **Nehik** | (n.dar.pir) Neh rojên xwedê peristinê. Rojên rojîgirtinê. |
| **Nehmilyon** | (hijn.l) Hijmara 9000,000. |
| **Nehsed** | (hijn.l) Hijmara 900. |
| **Nejad** | (n.x.nêr) 1.Koka mirovî :Nejadê kurdan arî ye. Tuxim.2. Navê mêrane. |
| **Neker** | (hk.l.çewa) Mirovê çi karan jibo xwe ne ke. Kêrnehatî. Tembel. Pend :Nekero dilkesero, kerewo xwerewo.ang ; mirovê rêncber herdem berhemdar û serferaze. |
| **Nekes** | (hk.l.çewa) Bêkes. Bêrê. |
| **Neko** | (pêrb) rêzman 1. Alavê hoşdarîkirnê jibo kiyareka bive. Hişyarbe!. Ne webit!. 2. Bigoman .bi tirsan.: Kuro;neko te ew kar kirîye?. berhevkirîne jibo çandinê. Mitil. |
| **Neman** | (k.jn.l.mê) Mirin. Jinav çûn. Biryan. Qirbûn. ::Ji mêje dapîra hevalî nemaye!. |
| **Nemaze** | (hk.x.çewa) Taybet. Nexasim. : Karek, mirovek, tiştek ê nemaze. |
| **Nemerd** | (hk.l.çewa) Çirîk. |
| **Nemêr** | (hk.l.çewa) Zelamê hedamê wî yê guhnelîyê kar na ke. |
| **Nemêrbûn** | (k.jn.gl.mê) Karnekirina hedamê nêr jibo guhnelî yê. Ji mêrînî kevtin. (K) bn: Bûn. |
| **Nemêrî** | (n.l.mê) derd Nemêrbûn. |
| **Nemêrkirin** | (k.jn.gl.mê) Ji mêrînî xistin. :Diktorî nexweş nemêr kir. Xesandin. (K) bn: Kirin. |
| **Nemir** | (hk.l.çewa) 1.Mirovê xizmetek mezin di ket û navdeng di bit, herçende di mire, lê navê wî her sax li ser ezmanê xelkî di mîne.2. Nêvê mêrane. |
| **Nemre** | (n.x.mê) Hijmar. Pile. |
| **Nenas** | (hk.l.çewa) Kes yan tiştê mirovî berî noke nedîye. Biyanî.: Mêvanê me yê nenase. Br× Nas. |
| **Nepak** | (hk.l.çewa) Mirov nepak; mirovê herimî, mirovê neçê, mirovê dilpîs. Gemar. |
| **Nepaqij** | (hk.l.çewa) Nepak. |
| **Nepenî** | (n.dar.mê) Tiştê ne diyar, veşarîtî. Nexuya. |
| **Neqandin** | (k.jn.x.mê) Niqandin. |
| **Neqandî** | (hk.dar.çewa) Çavê girtî. Hatî neqandin. |
| **Neqole** | (hn.l.çewa) Nerawestayî. Ne hecimtî. Berevajîya tena. |
| **Nerast** | (hk.l.çewa) Çewt. Maş.Berevajîya rast. |
| **Nerev** | (hk.l.çewa) 1.Xweragir di ceng û nexweşîyan da. Mêrxas. Cavnetirs. Nebez.2. Navê xortane. |
| **Nerênî** | (hk.dar.çewa) Kar yan tiştê şaş, nerast , nedirist. Ne . Br×Erênî, eyînî. : Di civînê da karên erênî û nerênî hatin xuyakirin. |

| | |
|---|---|
| **Nerim** | (hk.x.çewa) 1.Tiştê mirov bi girtinê di zanit yê nerme, ango di navêkda diçit. Vil. :Pembû yê nerim. :Nivînêd nerim. 2. Mirovê lis er xwe. Pend : Zimanê nerim û erê, mar ji konê di hêt derê. Br× Req. |
| **Nerimbûn** | (k.jn.l.mê) 1.Tiştê req nerim di be. : Erdê jiber baranê nerim di be.2. Mirov piştî bêhina wî fireh di bit, axivtina wî jî nerim di bit. (K) bn :Bûn. |
| **Nerimker** | (n.dar.dz) Yê tiştî nerim di ke. |
| **Nerimkirin** | (k.jn.l.mê) Vilkirin. Piloxkirin. : Divêt tu serederîya xwe di gel xelik î nerim bi kî. : Hevîr nerim kirin. (K) :Kirin. |
| **Nerind** | (hk.l.çewa) Xirab. Xera. Neqenc. |
| **Nerindî** | (n.l.mê) Xirabî. |
| **Nerîman** | (n.x.nêr) Navê keç û xortane. |
| **Nerme** | (hk.dar.çewa) Axa nerim jibo kolan û çandinê ; Axa rezê me nermeye. :Goştê nerme.ang ; yêbê hestî. |
| **Nermik1** | (hk.dar.çewa) Mirovê binvebinve. Pend : Nerimkê bin kayê,agir berda dinyayê. |
| **Nermik 2** | (n.dar.nêr) can Cihên nerim ji canê mirovan. :Nermikê guhî. |
| **Nermî** | (hk.dar.çewa) Ziman û serederîya hêdî û nerim bi xelikî ra. |
| **Nermîn** | (hk,hn.dar.çewa) 1.Nîşana nazikîyê.2.Navê jinane. |
| **Nesax** | (hk.l.çewa) Mirov, giyandar, darûbar ên bi êş.ne saxlem. Nisax. Nexweş. |
| **Nesrîn** | (n.x.mê) gul 1. Core guleke. 2. Navê keçane. |
| **Nestêl** | (n.x.dz) Zaro. Biçûk. Xort. Genc. |
| **Neşmîl** | (n.x.mê) Navek jinaneye. |
| **Neşter** | (n.x.mê) Kêrika devtenik û tîj.Nişter. |
| **Neşterger** | (pîşn.dar.dz) Nojdarê kelaştina canê mirov û candaran bi neşterê, dako parçek zêde, yan madeyek kul û zêde derêxit û çare bi ket. |
| **Neştergerî** | (karn.dar.mê) Karê nojdarê neşterger. |
| **Netewe** | (n.x.mê) Nasname û pêkhatîya miletekî ko ziman û çanda xwe hebit. Neteweya kurd. Gel. |
| **Neteweperês** | (hk.l.çewa) Neteweperwer. |
| **Neteweperist** | (hk.l.çewa) Mirovê gelek hez ji neteweya xwe di ke. Nejadperist. |
| **Neteweperistî** | (n.l.mê) Nejadperistî. |
| **Neteweperwer** | (hk.l.çewa) Dilsojê neteweya xwe. Neteweperist. |
| **Neteweperwerî** | (n.l.mê) Viyana gel û neteweyê. |
| **Neteweyî** | (hk.dar.çewa) Kes yan tiştê girêdayî netewekê bit. :Ew mirovek neteweyî ye ; ang ; xemxorê neteweya xweye, ziman, çand û ala xweye. : Ahengên neteweyî. Welatparêz. Millî. Gelvan. Gelêrî. |
| **Netewî** | (hk.dar.çewa) Neteweyî. |
| **Nevisî** | (n.x.dz) Zarokê babê wî mirî yan dayka wî hatî berdan, û dayka wî dubare mêrkirî, zaro di be nevisî jibo mêrê daykê û heger bab jineka din bi hînit û zaroyên mêrî nevisîyên jina wî ne. :Ango zaro nevisîyên jinbab yan zirbabê xwene. |
| **Nevî1** | (n.x.dz) Zarokên kurî yan kiça mirovî çi xort yan keç bin.: Nevîya wî, nevîyê wî. |

| | |
|---|---|
| **Nevî 2** | (hk.x.çewa) Nizim. Ne bilind. Kin. |
| **Nevîbûn** | (k.jn.lm) Nizinbûn. (K) bn : Bûn. |
| **Nevîçirk** | (n.dar.dz) Zarokên nevîyan. :Ewî deh nevîçirk hene. |
| **Nevîkirin** | (k.jn.l.mê) Nizimkirin. : Serê xwe nevî ke, da te ne bûnit!. (K) bn :Kirin. |
| **Nevîyan** | (n.jn.l.mê) Neyarî. Nehezî. Pend : Nevîyane, nedîtin dermane.ang; mirov ji dujminê xwe dûr be. Br× Vîyan. |
| **Newal** | (hk.cih,n.x.mê) bn : Nihal. Dol. |
| **Newekhev** | (hk.l.çewa) Ji hev cuda. Ne wekî êk. |
| **Newekhevî** | (n.l.mê) Pêkve ne çûn. Hevnegirtin. Ji hev dûr. Jêk dûr. |
| **Newêr** | (hk.l.çewa) Tirsonek. Kulafe. |
| **Newêran 1** | (hk.l.çewa) Cihê ava. Ne kavil. |
| **Newêran 2** | (k.jn.l.mê) Tirsan. : Ez newêrim bi şev derkevim. (K) bn: Wêran. |
| **Newêrek** | (hk.l.çewa) Tirsonek. |
| **Newkîn** | (k.jn.x.mê) Newnewkirin. Miyawîn. : Kitik ji birsan di newike. |
| **Newroz** | (n.l.mê) 1. Roja nû. 2. Cejna sersala kurdan, li 21 avdarê. 3. Navek kurdî nêr yan mê ye. |
| **Newzad** | (n.l.nê) 1. Nûbere.Nivşê nû.2.Naveke kurdî mêrane. |
| **Nexasim** | (hk.dar.çewa) Nemaze. |
| **Nexrî** | (hn.x.çewa) Kur yan kiça êkê. :Mivan nexrîyê deyka xweye. ang; yê yekeme , ji hemûyan mezintire. |
| **Nexrîn** | (hk.x.çewa) Mirovê ji xew ra di bit û hêj xwarin nexwarî. : Ez nikarim cigarê bi kêşim jiber ku yê nexrînim. |
| **Nexrînî** | (n.dar.mê) Dema mirov spêdê ji xew ra di be hêj çi ne xwarî yan vexwarî.Bapîrê min bi nexrînî cigare kêşa[vexwar]. |
| **Nexrînîşikandin** | (k.jn.l.mê)Yekem parîyê xwarin yan qurça vexwarinê, mirov di xwe li spêdê. : Min nexrînî a xwe bi sêvekêşikand. |
| **Nexş** | (n.x.mê) Hunerê kêşan û çêkirina nîgar û risman li ser kevir, kaxez, perok û htd. |
| **Nexşandin** | (k.jn.x.mê) Xemilandin ciwankirin bi nexşan.(K) bern: ez di nexşînim em di nexşînîn, tu di nexşînî hûn di nexşînin, ew di nexşîne[..it] ewan di nexşînin. Pr:dê bi +bern. Berdb : di nexşand, di nexşandin.db,dûr:nexşandibû, ... bûn. (F) : bi nexşîne, bi nexşînin. |
| **Nexşe** | (n.x.mê) Wêneyên kêşayî, bi reng û xîçan yên welatan ku têda dirêjî, firehîya welatî û bajêr,çem , çiya û htd, hatîne diyarkirin. : Nexşeya Kurdistanê. |
| **Nexşkêşan** | (k.jn.l.mê) Nîgarkêşan.Nexş çêkirin.(K) bn : Kêşan. |
| **Nexşkirin** | (k.jn.l.mê) Nexşandin. (K) :Kirin. |
| **Nexweş** | (hk.l.çewa) 1.Nesax. Nexoş. 2. Bêtam. |
| **Nexweş bûn** | (k.jn.gl.mê) 1. Nesaxbûn. : Jiber sermayê ... nexweş bû. 2.Bêtambûn. : Ev zade piştî sar bûy, tama wî nexweş bûye. (K) bn : bûn. |
| **Nexweş kvetin** | (k.jn.gl.mê) Nisaxbûn. |
| **Nexweş kirin** | (k.jn.gl.mê) 1. candar Nisaxkirin. 2. zad Bêtamkirin. : Kabanîyê hine xwê ya kirîye vê xwarinê, ta tama wê nexwş kirî. (K) bn : kirin. |

| | |
|---|---|
| **Nexoş** | (hk.l.çewa) Nexweş. |
| **Nexoşxane** | (hk.cih,n.dar.mê) Xestexane. |
| **Next** | (n.x.nêr) Diravê daybab yan semyanên keçê wer di girin hember dane şûyaya wê. Bihayê keçan.:Nextê kiça te çende? Wî keça xwe da şû bê next. |
| **Ney** | (n.x.mê) mûzîk Amêrekê mûzîkê yê pifkirinê ye. |
| **Neyar** | (n.l.dz) Dujmin. BrxYar. |
| **Neyarî** | (n.l.mê) Nehezî. Dujminî. |
| **Neyeksan** | (hk.l.çewa) Ne wek hev. Ji hev cuda. Ne hindî êk. |
| **Neyînî** | (hk.dar.çewa) Nerênê. |
| **Neyjen** | (karn.dar.dz) Kesê li neyê di xe. Lêderê neyê. |
| **Neyjenî** | (karn.mê) Karê jenîna amêrê neyê. |
| **Neynik** | (n.x.mê) Mûşeya mînaka mirovî berevajî di kit û mirov xwe têra di bînit. Xodîk. |
| **Neynok** | (n.x.mê) Nînok. Penc. |
| **Neyvan** | (karn.dar.dz) Neyjen. |
| **Nezan** | (hk.dar.çewa) Mirovê tênegehiştî. Kêmaqil. Mejîhişik. Xişîm. Pend :Heger nezanî, çav de cîranî. Pend :Xudê aşê nezanan di gêrit. |
| **Nezanî** | (n.l.mê) Tênegehiştin. Pend :Nezanî xweşîya giyanî. |
| **Nezanîn** | (jn.l.mê) Tênegehiştin. : Ew ji nezanîna xwe wesa di axivit. |
| **NY** | (kurt) Neteweyên yekgirtî. Neteweyên yekbûyî. |
| **Nê** | (pêrb) rêzman Alaveke jibo girêdana hevekan bi kar di hêt. Manê. Êdî. Jiberko. :Nê min ne dizanî tu dê hêy. :Nê ez na çim mal. |
| **Nêçîr** | (n.x.mê) 1. Karê lêgerîn û kujtina giyandarên kûvî. 2.Giyandarê di bit qurbanî li dema nêçîrê. Rav. |
| **Nêçîrkirin** | (k.jn.l.mê) Kujtina giyandarên kwîvî. Ravkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Nêçîrvan** | (pîşn.dar.dz) Mirovê karê wî nêçîr, yê nêçîra giyandarên kûvî di kit. |
| **Nêçîrvanî** | (karn.dar.mê) Karê rav û nêçîran. |
| **Nêk1** | (n.x.mê) Gopik. |
| **Nêk 2** | (n.x.mê) can Kemax. |
| **Nêr** | (hk.x.çewa) 1.Mirov, giyandar û hişînkatî yê hedamê nîrîn hebit. mêr, xort, bab, bira, peya û htd. Ker, hesp, nêrî, beran, seg, dîkil û htd. Pend :di bêjim nêre, di bêje bi doşe. Ang; kesê liser çewtîya xwe rijd. S.2. rêzman Navên nêr: Azad, çiya, ser, dest, didan,gopal, û htd. Br × Mê. |
| **Nêrevan** | (pîşn.dar.dz) Mirovê karê nêrîn û dwîvçûnê di ket. Zêrevan. |
| **Nêrevanî** | (karn.dar.mê) Zêrevanî. |
| **Nêrg** | (hk.x.çewa) Hêzdar. Bi hêz. Tund. |
| **Nêrgiz** | (n.dar.mê) gul 1.Guleka reng zer û ciwane li çiyayên Kurdistanê hişîn dibit. 2. Navê keçane.Pend :Nêrgiz ne bihare. |
| **Nêrik** | (n.dar.mê) Qed yan bistîka ter ya giyayên xwerinê. ; Nêrika kerbeşkê, rêvasê û htd. |
| **Nêrî** | (n.x.nêr) candar 1.Giyandarrekê malî ye, endamê nêr heye ji bira şîrderane. Nîrînê bizinî. 2.kevin Navê zelamane. |

| | |
|---|---|
| **Nêrîn** | (k.jn.x.mê) Berêxwedan. Boçûn. :Nêrîna te çîye bo karê me kirî? ; tu çewa di bînî? (K) bdn: ez di nêrim em di nêrîn, tu di nêrî hûn di nêrin, ew di nêre[...it] ewan di nêrin. Pr:dê bi + bdn.Bdb : di nêra, di nêran. Db,dûr : Nêrabû, ... bûn. (F): bi nêre bi nêrin. |
| **Nêrwe** | (hk.cih,devern,tîren) 1. Devereke li Kurdistanê. 2. Hozeka kurdane li Kurdistana îraqê. |
| **Nêrweyî** | (malban..dz) Kesê di koka xweda ji hoza nêrwe ye. |
| **Nêrz** | (n.x.nêr) Gilçê di karit hemû gilçan. Sergilç. |
| **Nêz** | (hk.x.çewa) Nedûr. :Mala Azadî nêzî ya mamê wî ye. |
| **Nêzbûn** | (k.jn.l.mê) Nêzîkbûn. |
| **Nêzî** | (hn.çewa) Nêzîkî. |
| **Nêzîk** | (hn.x.çewa) Nêz. |
| **Nêzîkbûn** | (k.jn.l.mê) Kêmbûna dûrîyê. : Newroz ya nêzîk bûy. (K) bn : bûn. |
| **Nêzîkî** | (n.dar.mê) Heyam. Dûrî. : Eve nêzîkî deh rojane ez li vê derê. |
| **Nêzîkkirin** | (k.jn.l.mê) Kurtkirina dûrîyê. : Xo nêzîkî wî ne ke,ew yê nesaxe. |
| **Nêzkirin** | (k.jn.l.mê) Nêzîkkirin. |
| **NH** | (kurt) Kurtkirina Neteweyên Hevgirtî. Rêkxistîyeka navneteweyîye, baregayê wê li Emrîkaye û piranîya welatên cîna têda endamin. |
| **Nicimîn** | (k.jn.x.mê) bn : Necimîn. |
| **Nifrîn** | (n.x.mê) Nizaya xirabîyê. Dijûn. : Xudê pişta dujminan bişikêne. Xudê wî nehêlit!. Pend : Nifrîn di du serin. |
| **Nifrînkirin** | (k.jn.l.mê) Daxaza şikestin û nemanê ji xudê, jibo yekî kirin. Dijûndan. |
| **Nifş** | (n.x.nêr) bn : Nivş. |
| **Nig** | (n.x.nêr) can Ling. |
| **Niha** | (hk.dem) Vê gavê. Noke. Niho. :Niha demjimê 9.50; e. |
| **Nihal** | (hk.cih,n.x.mê) Cihê navbera du giran ê kûr û avê xwarî, bi av yan bê av. Newal. Dol. |
| **Nihalk** | (hk.cih,n.dar.mê) 1. Dola biçûk.2. Dolikê avê. |
| **Nihanî** | (n.x.mê) Cihê mirov bi kare xwe bi de ber dema baran û berf di barit. Avayî. Berevez. Pend : ewrê sorê spêdeyan , gazî di kite karwanîyan, xwe bi dene nihanîyan. |
| **Nihênî** | (hk.x.çewa) Nepenî. Veşarî. |
| **Nihêl** | (hk.cih,n.x.mê) Aqarên bi dol, nihal û gir. |
| **Nihêlî** | (maln) Tîreyeka kurdane li Kurdistana îraqê. |
| **Niho** | (hk.dem) Niha. |
| **Nihom** | (n.x.mê) Texe. |
| **Nijde** | (n.x.mê) Hêriş. Talan. Cerde. |
| **Nijdevan** | (karn.dar.dz) Talanker. Rêgir. Cerdevan. |
| **Nijinandin** | (k.jn.da.mê) Nijinîn. Avakirin. Br×Herifandin. (K) bdn: ez di nijinînim em di nijinînîn, tu di nijinînî, hûn di nijinînin, ew di nijinîne[…it] ewan di nijinînin.Pr:dê bi +bdn. Bdb: di nijinand, di nijinandin. Db,dûr: nijinandibû, nijinandibûn. (F): bi nijinîne, bi nijinînin. |

| | |
|---|---|
| **Nijinîn** | (k.jn.x.mê) 1. Li ser hev danana ber û keviran bi awayek endazeyî bo şûrheyên rez, bax, avayî û htd. Kelek çêkirin. Mûrhekirin.2. Dema mirov di kevit di hizir û aşûpan da.Hizirîn. : Ez herê di nijinim û di herêfim, nizanim dê çi bi kim. (K)bdn: ez di nijinim em di nijinîn, tu di nijinî hûn di nijinin, ew di nijine[..it] ewan di nijinin. Pr: dê bi +bdn. bdb :di nijinî. di nijinîn. db,dûr : nijinîbû, ...bûn. (F): bi nijine bi nijinin. |
| **Nik** | (pêrb) rêzman Alaveke jibo hebûna tiştê li rex mirovî, nêz. Li nik. li ba, li cem. : Were nik min da bo te gotinekê bi bêjim. |
| **Nikare** | (n.x.nê) Amêrek hesine jibo nikirandina dar û beran bi kar di hêt. Mikare. |
| **Nikarîn** | (k.jn.dar.mê) Ne şiyan. :Eger tu nikarî berhev bibî, têlefonê bike. (K) : Ez nikarim em nikarin, tu nikarî hûn nikarin, ew nikarit ewan nikarin. |
| **Nikil** | (n.x.nêr) can Dimê tewalan. |
| **Nikilandin** | (k.jn.dar.mê) Balinde nikilê xwe lê di din.Cihê nikilê tewalan li sere. : Çûçikan ev hijîre ya nikilandî. Nikirandin. |
| **Nikillêdan** | (k.jn.l.mê) Nikilandin. |
| **Nikrandin** | (k.jn.dar.mê) Têkolan û renîna tiştê req, nexasim ber û keviran. (K) bdn: ez di nikirînim em di nikirînîn, tu di nikirînî hûn di nikirînin, ew di nikirîne[..it] ewan di nikirînin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : di nikrand, di nikrandin. Db,dûr: nikrandibû, ...bûn. (F): bi nikirîne, bi nikirînin. |
| **Nimandin** | (k.jn.dar.mê) Nerimkirina tiştek, xwarinek nemaze di avêdatanî nerim di be. : Danhêrkî bi nimîne dako bi bite kutilk. Birinc nimandin. Savar nimandin. Erd nimandin. (K) bdn: ez di nimînim em di nimînîn, tu di nimînî hûn di nimînin, ew di nimîne[...it] ewan di nimînin. Pr: dê bi + bdn. Bdb : di nimand, di namandin. Db,dûr : nimandibû, ...bûn. (F) : bi nimîne, bi nimînin. |
| **Nimêj** | (n.x.mê) Nivêj. |
| **Nimîn** | (k.jn.x.mê) Nerimbûn. : Erd di nimit, dan yê nimay. |
| **Nimre** | (n.x.mê) Nemre.Pile. |
| **Nimûne** | (hk.x.çewa,n.x.mê) 1. Mînak. : Mamosta çend nimûne gotin dako xwendekar tê bi gehin.2. Serpişk. Bevil. : Araz nimûneya qutabîyên çelenge. |
| **Nimûneyî** | (hk.dar.çewa) Serpişk. Serbor. : Xandingeha nimûneyî. |
| **Nimyan** | (k.jn.x.mê) Niman. |
| **Nimyayî** | (hk.dar.çewa) Tiştê bi avê hatî nerimkirin. Hatîye nimandin. :Danê nimyayî bi kêr vestirînê di hêt. |
| **Niqanidin** | (k.jn.x.mê) Dema mirov yan giyandar çavên xwe liser hev di danin, nexasim dema nivistinê. (K) bdn: ez [çavên xwe] di niqînim em di niqînîn, tu di niqînî hûn di niqînin, ew di niqîne[...it] ewan di niqînin. Pr :dê bi+bdn. bdb : di niqand, db,dûr : niqandibû, niqandibûn. (F): bi niqîne bi niqînin. |
| **Niqav** | (n.I.mê) Belemek taybete di binê avêda di gerit jibo karên nêrîn û leşkerî bi kar di hînin |
| **Niqîn** | (k.jn.x.mê) Çavniqan. Çav kevtin serêk. ; Mirov di nivit, çavên wî di niqin |

| | |
|---|---|
| **Niqrosk** | (n.dar.pir) Dema çavên mirovî di kevin serêk û serê mirovî radihejit û xewa mirovî di hêt |
| **Niqroskhatin** | (k.jn.l.mê) Xewhatin. : Niqroskên vî zarokî yên di hên, xewa wî ya di hêt |
| **Nirandin** | (k.jn.x.mê) Giyandarên dirinde, mîna şêr, piling, dengî ji xwe di hînin. :Şêrî nirand |
| **Nirên** | (n.x.mê) deng Dengê xurêna hinde candarên dirinde, wek şêr, piling |
| **Nirx** | (n.x.mê) Biha. Giranî. Seng. |
| **Nirxandin** | (k.jn.dar.mê) Nirxandina mitayî, keleûpelan: Danan û zanîna bihayê wan. Sengandin.Helsengandin .Nirxandina mijarek, gotinekê : Destnîşankirina erênî û neyînîyan. Hilsengandin. (K) bdn : ez di nirxînim em di nirxînîn, tu di nirxînî hûn di nirxînin, ew di nirxîne[. . .it] ewan di nirxînin Pr :dê bi+bdn. Bdb : di nirxand, di nirxandin. Db,dûr nirxandibû,nirxandibûn. (F): bi nirxîne, bi nirxînin. |
| **Nirxdanan** | (k.jn.I.mê) Nirxe liser danan. |
| **Nirxkirin** | (k.jn.l.mê) Danan nirxê li ser mitayî di danin Biha li ser danan. (K) bn : Kirin. |
| **Nişa** | (n.x.mê) Arik. |
| **Nişîn** | (jn.x.mê) Rûniştin. Xwarkevtin. |
| **Nişîv** | (hk.cih,n.x.nêr) Nizim. Xwar. Bin. Br x Evraz. |
| **Nişîvî** | (n.dar.nêr) Jordanî. Nizimî. |
| **Nişkav** | (hk.x.çewa) Bûyer yan rûdanek bi lez û ne çaverêkirî. :Ji nişkav min dît bi jor keft. Demildest |
| | 471 |
| **Nişkêve** | (hn.dar.çewa) Nişkav. Ji nişkêve. |
| **Nişter** | (n.dar.nêr) Kêrik û devikên sertîj , seqa kirî, bo derkirina kulik yan birînan tê bi kar anîn. |
| **Niştin** | (k.jn.x.mê) Nişîn. |
| **Nişûv** | (n.x.nêr) Nişîv. |
| **Nişyan** | (k.jn.x.mê) Niştin. |
| **Nivan** | (n.x.pir) Nivîn. |
| **Nivandin** | ( k.jdar.mê) Dema mirov yekî di nivîne. Daykê zarokê xwe nivand. (K) bdn: ez di nivînim em di nivînîn, tu di nivînî hûn di nivînin, ew di nivîne[..nit] ewan di nivînin. Pr :dê bi + bdn. Bdb: di nivand, di nivandin. Deb,dûr: nivandibû,nivandibûn. (F): bi nivîne bi nivînin |
| **Nivêj** | (n.x.mê) Nizayeka taybete mirov daxazê ji xudê di kit dako li gunehên mirovî biborit û rêya rast nîşanî bi dit. :Her dînekî nivêja xwe ya taybet heye , yên misilmanan rojê pêncin. |
| **Nivêjker** | (kam.dar.çewa) Mirovê nivêjan di ke. |
| **Nivêjkirin** | (k.jn.I.mê)) Dema mirovê dîndar nivêjan di ke. (K) bn :Kirin. |
| **Nivêsan** | (k.jn.x.mê) Nivêsîn. |
| **Nivêsevan** | (kam.dar.dz) Kesê şîyanên nivêsînê hene, wek raport, gotar, peyam û htd. Nivîsevan. Nivîskar. |
| **Nivêsîn** | .(k.jn.x.mê) Hizir û pilanên mirov bi qelemî li ser kaxez yan tiştên dî da bi rêjit. (K) Bdn: ez di nivêsim em di nivêsîn, tu di nivêsî hûn di nivêsin, ew di |

| | |
|---|---|
| | nivêse[...it] ewan di nivêsin..Pr. dê[bi] nivêsim, nivêsîn, nivêsî, nivêsin, nivêse[...it]. Bdb: di nivêsî,di nivîsîn. Db,dûr: nivêsîbû, nivêsîbûn. (F): bi nivêse, bi nivêsin. |
| **Nivêsîngeh** | (hk.cih.n.dar.mê) Cihê nivêsîn û parztina nivîsaran. |
| **Nivistin** | (k.jn.x.mê) Xewkirina candaran weke çavên wan di Kevin ser hev û ageh ji dinyayê namîne û zivrîna xûnê di leşîda hêdî di be. Xewtin. (K) bdn: ez di nivim em di nivîn, tu di nivî hûn di nivin, ew dinive[...it] ewan dinivin. Pr :dê bi + bdn. Bdb: ez di nivistim em di nivistîn, tu di nivinstî hiin,ewan di nivistin, ew di nvist.Db,dûr : ez nivistibûm, em nivistibûyn, tu nivistibûy hûn,ewan nivistibû, ew nivistibû. (F) : bi nive bi nivin. |
| **Nivistî** | (hk.dar.çewa) Mirov yan candarê di xew.Raketî. |
| | 472 |
| **Nivişti** | (n.x.mê) Kaxezek werpêçayî ye çend gotin û nizayên pîroz lê hatîne nivêsîn ko şêx, mela û oldar(dîndar) jibo nexweşan çê di kin dako ji derd û pîrhevîyan bi hên pariztin. |
| **Nivîn** | (n.dar.pir) Kelûpelên nivistinê wek doşek(nalîk), lihêf û balîf(palgeh). |
| **Nivîsar** | (n.dar.mê) Nivêsîn. |
| **Nivîsevan** | (kam.dar.dz) Nivêsevan. |
| **Nivîskar** | (kam.dar.dz) Nivîsevan. |
| **Nivîsvan** | (kam.dar.dz) Nivîsevan |
| **Nivok** | (hn.dar.çewa) 1. Sist. Nivistî. Nizim. 2. rêzman Pîtên nivok.ang Pîtên dengdêr. (a,e,ê,i,î,o,u,û). |
| **Nivş** | (n.x.nêr) Berebab. Kok. Tuxim. Rivişt. : Kurd ji nivşê arî ne. |
| **Nivşperist** | (hk.I.çewa) Kesê cudayî ya nivş, dîn, deveran di ket û tiştên xwe ji yên xelik ê din baş û pîroztir di zanit. |
| **Nixandin** | (k.jn.x.rmê) l.Tewandin. Çemandin.Nizmandin.2. Pirkirin. Tijîkirin. Qubandin.(K) bdn: ez di nixînim em di nixînîn, tu di nixînî hûn di nixînin, ew di nixîne[. . .it] ewan di nixînin. Pr: dêbi +bdn. Bdb : di nixand, di nixandin. Db,dûr : nixandibû, nixandibûn. (F) : bi nixîne, bi nixînin. |
| **Nixavtin** | (k.jn.x.mê) Paraztina xwarin û mita û tiştên din, bi perokekî yan her tiştekê din bi ser da di din. Dapoşîn. (K) ber,dn: ez di nixêvim em di nixêvîn, tu di nixêvî hûn di nixêvin, ew di nixêive[..it] ewan di nixêvin. Pr : dê bi xberd,dn. Berd,db : di nixavt, di nixavtin. Db,dûr : nixavtibû, ...bûn.(F) : bi nixêve, bi nixêvin. |
| **Nixêv** | (n.x.mê) Derpoşk. Dervank. |
| **Niximandin** | (k.jn.x.mê) Nixavtin. |
| **Nixivandin** | (k.jn.x.mê) Nixavtin. |
| **Nixte** | (n.x.mê) Rojê ewir û bi barîna befir û baranan.Çirçove. :Evroj rojeka nixteye. |
| **Nixyan** | (k.jn.x.mê) Hatin nixandin. |
| **Niyan** | (n.x.mê) Kutan.Perîn. |
| **Niyandin** | (k.jn.x.mê) Kutan. Perîn |
| | 473 |

| | |
|---|---|
| **Niyaz** | (n.x.mê) Karekê mirovî pilan jibo dana ye ku dê bi ket. Niyet. : Niyaza min ewe ku ez ev sale biçim derveyî welat.min li ber, ... |
| **Niza** | (n.x.mê) Dema mirov ji xwere daxaza çakîyê ji xudê di kit. Nivêj. |
| **Nizakirin** | (k.jn.l.mê) Daxaz ji xudê kirin. Nivêjkijkirin. Destên xwe hember xwedê serevrazkirin. |
| **Nizar** | (hk.cih.n.x.nêr) l.Cihê beten û na kevit ber rojê. Brx Beroj. 2. Navê mêrane. |
| **Nizim** | (hk.x.çewa) Nevî. Kin. : Dara nizim. Xanîyê nizim. Dengê nizim. |
| **Nizimbûn** | (k.jn.I.mê) Nevîbûn. Kinbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Nizimkirin** | (k.jn.l.mê) Nevîkirin. Kinkirin. Kêmkirin. :Dengê xo pîçek nizim bi ke, mirov di nivistîne!.(K) bn: Kirin. |
| **Nizniz** | (n.I.mê) deng Dema zarok bi girî ii gazinde daxazekê bi ke, yan dema zaro ne rihet bit. |
| **Niznizkirin** | (k.jn.dar.mê) Dema zarok niznizê di ke. (K) bn :K irin. |
| **Niznizok** | (hk.dar.çewa) Zarokê herdem niznizê di ke. |
| **Nî** | (hn.x.çewa) Tiştê taze û ne kevin.Nû. :Cilikên min di nî ne. Br X Kevin. |
| **Nîdar** | (hn,hk.dar.çewa) 1. Nû. 2.Navekê kurdî ye jibo nêr û mêyan bi kar di hêt. |
| **Nîgar** | (n.x.mê) Wêne. Mînak.Nexş.2. Navê xort keçane. |
| **Nîgarkês** | (pîşn.dar.dz) Kesê nîgaran di kêşe. Pisporê wênekêşanê. |
| **Nîgarkêşan** | (k.jn.I.mê) Wêne çêkirin. Keval çêkirin. (K) bn: Kêşan. |
| **Nîgarkêşî** | (kam.I.mê) Karê kêşana nîgaran. |
| **Nîgarkirin** | (k.jn.I.mê) Nîgarkêşan. Wênekirin. (K) bn :Kirin. |
| **Nîhatî** | (hk.l.çewa) Kesê nî dest bi karî kirîye, wek xwendekar, leşker, karker û htd. Pend :Nî hatin kevin xelatin. Ang; dema tişt yan mirov ê nû peyda di be, ê kevin kêm biha dibe. |
| **Nîien** | (hk.l.çewa) Nûkirî. Nûjen. |
| **Nîjenkirin** | (k.jn.I.mê) Tiştê dubare bi hêt nîkirin , wek xanî, pir, cade û htd. (K): bn: Kirin. |
| **Nîjenkirî** | (hk.I.çewa) Avayîyê dubare hatî çêkirin(nîkirin). |
| **Nîjtin** | (k.jn.x.mê) Wekî yekî bi xurtî ji cihekî bi kî der. Derêxistin. Derkirin. Bi nîje, dê bi nîjim. di nîjîn. |
| **Nîl** | (cugimx.nêr) Çemek mezine di welatê misir û Sodanê ra derbaz di be. |
| **Nîn** | (n.x.mê) Tune. Çine. Hijmara (0). |
| **Nîne** | (hn.neyîn.tek) Tune. Nebûn. : Min dem nîne li cem te bi mînim. :Ew li mal nîne. |
| **Nînin** | (hn.neyîn.pir) Tune. Nebûn. : Serdarî pare nînin tiroriibêlekê bo xo bi kirit. |
| **Nînok** | (n.x.mê) can Pareçe hestîyê pan û tenik li serê tilî(tibil) û pêçikên (tibilên pê) mirov ii hinde candaran. Penc. |
| **Nîre** | (n.x.nêr) bn: Kête. ;Nîre jibo kotanê peyda kirin. |
| **Nîsk** | (n.x.mê) giya 1 . mita Core mitayek rengsor yan zere, li Kurdistanê tê çandin, danê wê di hêt kelandin xwarika bi mifa û tam, jê çê di bit. 2. Xwarina ji nîskan tê çêkirin. |

| | |
|---|---|
| **Nîşadan** | (k.jn.l.mê) I. Dema mirovî divê tiştekî dane ber çavên yekî. :Ew çîye di destê teda, ka nîşa min bi de?. 2.Hînkirin Fêrkirin. : Bê zehmet dê şêy vê waneyê nîşa min bi dî? (K) bn: Dan. |
| **Nîşan** | (n.x.mê) 1. Saloxdan. Sîmbol.2. Xal. Şûp. Pend :Nîşanên mirinê tane, yên nixtê hane.Pend :Nîşanên kurkan çoxikên hirîne, yên keçikan ser û kezîne. |
| **Nîşandan** | (k.jn.l.mê) bn: Nîşadan. |
| **Nîşêdan** | (k.jn.I.mê) Nîşadan. |
| **Nîşangir** | (hk.dar.çewa) Sêregir. Sêrevan. |
| **Nîşangirtin** | (k.jn.I.mê) Mirov bi tiveng yan tîran bi çavî hûrik sêrê li nîşana venayî di girit di havêjtê dako bi hingêvit. Sêregirtin. (K) bn: Girtin. |
| **Nîşanî** | (n.dar.mê) Jibo ko xelik bizanin ya xwaztîye, nîşanekê bi keçê ve di kin,wek gustîlk û demjimêre, hin caran ahengeka xêzanî biçûk li mala bûkê bi vê hilkevtê di gêrin û şirînî di hêt belav kirin. |
| **Nîşankirin** | (k.jn.I.mê) Jibo nasîn û ji bîr nekirin, mirov tiştî bo xwe nîşanekê lê di ket yan da di nit. : Min qelemê xwe yê nîşan kirî, da ji yên hevalan cuda bi bit. (K): bn Kirin. |
| **Nîşankirî** | (hk.I.çewa) Hatîye nîşankirin. : Ev bizine ya nîşankirîye.:Kitêba nîşankirîye. |
| **Nîsanxweş** | (hk.l.çewa) Kesê bi tivengê yan tîrê li nîşanê di xe.Sêrevan. Seyvan. |
| **Nîştecih** | (hk.l.çewa) Xwecih. Xocih. |
| **Nîştecihbûn** | (k.jn.gl.mê) Xwecihbûn. : Ez li bajêrê Duhokê nîştecih bûm. (K) bn: Bûn. |
| **Nîstecihkirin** | (k.jn.gl.mê) Xwecihkirin. : Hikometa Kurdistanê, pnzdeh mal li gundê me nîştecih kirin. (K) bn: kirin. |
| **Nîstiman** | (n.x.nêr) Wargehê gelan. Welat. :Nîştimanê me Kurdistane. |
| **Nîştimanperwer** | (hk.I.çewa) Kesê hez ji nîştimanê xwe di ke.Welatparêz. |
| **Nîv** | (n.x.mê) I. Parçeka tiştê kerkirî (pirtkirî) bo du parçeyên wek hev. 1-2= '/2..2. 2. Xala di kevit nîva tiştî. Nîva xanî, . . . destî,. .. serî,.... û htd. |
| **Nîvbero** | (hk.l.çewa) bn :Nîvero. |
| **Nîvek** | (n.dar.mê) Nîv. : Nîveka pareyên mamê min bo cigaran di hên mezaxtin. : Nîveka serê wî kul bûye. |
| **Nîvenîv** | (hk.dar.çewa) Nîvnîve. |
| **Nîvero** | (hk.dar.çewa) Karê mirov nebit serî û bi nîvî bi hêle. Nîvbero. |
| **Nîvişk** | (n.x.nêr) rêçalî Xwarineka çevrî ye . Rûnê xumalî yê giyandaran yan rûnê karxaneyan. |
| **Nîvî** | (hk.dar.çewa) Lêkvekirina tiştî bo du pişkên wek yek. : Em dê bi hevra bazirganîyê kin û pare bi nîvî. |
| **Nîvîbûn** | (k.jn.I.mê) Parvebûn bo du nîvan. : Darên çiyayê rex gundê me jiber birîn û sotinê, bi nîvî bûne.(K) bn: Bûn. |
| **Nîvîkirin** | (k.jn.I.mê) Du pişikkirin.. : Min û hevalê xwe, xwarin bi nîvî kir. ang; her yekî nîvek gehiştê. :Sêv nîvî kirin. :Karê xwe bi nîvî kir.(K) bn : Kirin |
| **Nîvîkirî** | (hk.l.çewa) Tiştê kirîye du nîv. Pişikkirî. |
| **Nîvmêr** | (hk.l.çewa) Sinêle. Pend: Nîvmêre nabit têre.ang: nîvmêr gelek xwarinê di xwe. |

| | |
|---|---|
| **Nîvnîve** | (hk.dar.çewa) Nêzî nîvî biiye. Duker. Nîvên wek hev. : Pora serê wê nîvnîveye.ang; nîv sipî û nîv reş. |
| **Nîvreq** | (hk.I.çewa) Tiştê ne pir req û ne nerim. |
| **Nîvroj** | (hk.dem.I) Nîva rojê.ango demhijmêr duwazdehê rojê. |
| **Nîvro** | (hk.dem.l) Nîroj. |
| **Nîvşev** | (hk.dem.l) Nîva şevê. ango demhijmêr duwazdehê şevê. :Eve vê nîvşevê tu ji kûve dihêy?. |
| **No** | (pêrb) rêzman Alavê neyîkirinê. Ne. :Babê te li male?. No ne li mle. |
| **Nobe** | (n.x.mê) Dor. Ger. :Subahî nobeya teye a garanê, pezî, bizinî. |
| **Nobedar** | (kam.dar.dz) I . Kesê nobeyê di gire. Noba wî ye.2. Navek xortane. |
| **Nobedarî** | (n.dar.mê) Nêrevanî. Sexbêrî. |
| **Nobegirtin** | (k.jn.I.mê) Li dorê rawestan. Li gerê rawestan. |
| **Nojdar** | (pîşn.dar.dz) Pisporê karê çarekirina mirovan. Dixtor. Diktor. Pizîşk. |
| **Nojdarî** | (kam.dar.mê) Karê dixrorîyê. |
| **Nok** | (n.x.mê) giya mita Mitayekê dindik xire li Kurdistanê di hêt çandin û bi gelek awayan di kin xwarin , wek kelandin, di gel avikan, qelandin ii htd. |
| **Noke** | (hk.dem) Niho. Vêgavê. :Noke tu bi çi ve mijûlî ?. |
| **Noker** | (hk.x.çewa) I.Xizmetkar. Xulam.2. Xwefirotî. |
| **Nokerî** | (n.dar.mê) I. Xulamînî. 2.Xwefîrotin. |
| **Nokerîkirin** | (k.jn.I.mê) Xolamînî ya xelikî kirin. (K) bn: Kirin. |
| **Nola** | (pêrb) rêzman Mîna. Wek. |
| **Nolî** | (pêrb) bn :Nola. |
| **Noş** | [niij](hn,hk.x.çewa) Pîroz. Saxlem. |
| **Noşêcan** | (hn.I) Daxaza leşsaxî ii nûjdarîyê bo êkî di xazin dema xwarinekê bi xwe yan vexwarinekê vexwue Nûşê can bit. |
| **Noşêcanbûn** | (k.jn.gl.mê) Pîroz bit. Demarniman. |
| **Noşîn** | (k.jn.x.mê) 1 .Bi xweşî vexwarin. Vexwarina doşavên pîroz.2. Navê pîrekane. |
| **Not** | (hijn.çend) Hijmara 90. |
| **Notem** | (hijn.desniş) Ya,yê, yên notê. |
| **Nothizar** | (hijn.I.çend) Hijmara90,000. |
| **Nnotmilyon** | (hijn.l.çend) Hijmara90,000,000. |
| **Nozdeh** | (hijn.çend) Hijmara 19. |
| **Nozdehem** | (hijn.çend) Jêgirtina hijmara 19.Ya/ yê/yên nozdehê. |
| **Nozdehemîn** | (hijn.çend) Nozdehem. |
| **Nozdehizar** | (hijn.l.çend) Hijmar 19.000. |
| **Nozdemilyon** | (hijn.l.çend) Hijmara 19,000,000. |
| **Nuh** | (hk.x.çewa) Nû. Taze. Teze. |
| **Nuha** | (n.dem) Noke. Niho. |
| **Nuhurandin** | (k.jn.x.mê) Axînk rahêlan. Xwezî xaztin.Poşmanbûn.(K) bdn: ez di nuhurînim em di nuhurînîn, tu di nuhurînî hûn di nuhurînin,ew di nuhurîne[. . .it] ewan di nuhurînin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : di nuhurand, di |

| | |
|---|---|
| | nuhurandin. Db,dtir : nuhurandibû, nuhurandibûn. (F) : bi nuhurîne, bi nuhurînin. |
| **Nû** | (hk.x.çewa) Nî. Taze. Ter. |
| **Nûber** | (n.x.dz) Zarokê yekê. Berê yekê. Nexrî. |
| **Nûbihar** | (n.l.mê) 1 . Biharek nû. 2. Navê pertoka(kitêba) helbestvanê mezin E. Xanî ye ya zarokan. |
| **Nûciwan** | (nl.dz) Xortên nû gehiştî. |
| **Nûçe** | (n.dar.mê) Dengûbas.:Nûçeyên êvarî. |
| **Nûçegihan** | (pîşn.I.dz) bn: Nûçevan. |
| **Nûçegihanî** | (kam.dar.mê) bn :Nûçevanî. |
| **Nûçevan** | (pîşn.dar.dz) Mirovê karê nûçeyan di ke û jibo dezgehekî di şîne. Peyamnêr. |
| **Nûçevanî** | (kam.dar.mê) karê gihandina ntiçeyan. Peyamnêrî. |
| **Nûdem** | (nl.mê) Dema nû. Hevçerx. Serdem. |
| **Nûj** | (nx.mê) candar kirmijoh Biyandarekê kirmijokê biçûke, li ser xwîna kelan di jît. |
| **Nûjenkirin** | (k.jn.l.mê) bn: Nîjenkirin. |
| **Nûjenkirî** | (hk.I.çewa) bn: Nîjenkirî. |
| **Nûke** | (hk.dem) Nû. Vêgavê :Nûke tu çi kar dikey?. :Nûke dema nûçeyên seqayî ( biyav) ne. |
| **Nûsal** | (hk.dem.l.mê) Sala nû. Sersal. |
| **Nûsan** | (k.jn.x.mê) Pêveman. Pêvemana kaxez,belg, cilik bi tiştekî ve. :Cilikên birîdarî ji ber xwînê bi leşî ve nûsan. |
| **Nûsar** | (n.x.mê) Aveka rengdare di kin qelemên pindan jibo nivîsînê. |
| **Nûsikandin** | (k.jn.x.mê) Pêve nûsan. : Kaxez bi stirkê bi dîwarî ve nûsikand. (K) : bi nûsikîne, di nûsikandin. |
| **Nûsîgiyan** | (hk.l.çewa) Pîroz. |
| **Nûşîgiyanbûn** | (k.jn.gl.mê) Pîrozkirin.(K) bn: Bûn. |
| **Nûşîn 1** | (k.jn.x.mê) Nosîn. |
| **Nûşîn 2** | (hk.x.çewa) Şirîn. |
| **Nûvedan** | (k.jn.I.mê) Ji nû ve geşbûn. |
| **Nûza** | (hk.l.çewa) 1. Nûber. 2. Nûjenkirî. |
| **Nwîsan** | ( k.jn.x.mê) Nûsan. |

# O

| | |
|---|---|
| **O** | 1.Pîta hejdehê ji abeya kurdî. 2. rêzman Alavê gazîyê. : Wa. |
| **Ocax** | (n.x.mê) bn: Îcax. Malbat. |
| **Ocaxzade** | (n.l.dz) Mirovê bi rûmet. Kurê ocaxan. |
| **Ode** | (n.x.mê) Mezel. Eywan : Xanî yê me ji çar odeyan pêk di hêt. |
| **Of** | (pêrb) rêzman Alavê kovan û dax, kovan û keserê. : Of çi bi serê hat. |
| **Oho** | (pêrb) rêzman Alavcke dema karek rû di dit, mirov hicmetî di be. : Oho eve vêca çiye?. |
| **Oksiçîn** | (n.biyan) Gazeka Bêreng, tam û bêhin e, di valayîyê da heye, mirov û canewer jibo bêhinkêşanê bi kar di hînin. 02. |
| **Okyanûs** | (n.x.mê) Deryayên mezin; mîna Etles, Hindî û htd. |
| **Ol** | (n.x.mê) Dîn. :OIa zerdeşt. Ola îslamê. |
| **Oldar** | (hk.dar.çewa) Dîndar. Xudênas. |
| **Olperist** | (hk.I.çewa) Dîndar. Xudêperês. |
| **Olperistin** | (k.jn.gl.mê) Xudaperistin. Dîdarî. |
| **Olperistî** | (n.I.mê) Kar û erkên peristina dînî. |
| **Olperwer** | (hk.I.çewa) Olperist. |
| **Olperwerî** | (n.I.mê) Olperistî. |
| **Once** | (n.x.mê) giya Giyayeke belgên wî di kesk,sê û hin caran çar tibilî ye, mina dilî ye. |
| **Oqyanûs** | (n.x.mê) Okyanûs. |
| **Or** | (nx.nêr) Zik. Den. |
| **Ordek** | (n.x.mê) tewal Balindeyek hêkkere, hişkavî ye. Werdek. |
| **Ordî** | (n.x.mê) Çekdarên fermî yên berevanî yê ji axa welatê xwe di ken. Leşker. |
| **Ordîgeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê xwecîhbûn û rahênanên leskerî. Serbazgeh. Leşkergeh. |
| **Orên** | (n.x.mê) Dengê çêlan. : Dengê orêna golikê di hêt. |
| **Org** | (n.cîh.x.mê) mûzîk Amêrek mûzîkî ye. Orgel. |
| **Organ** | (nbiyan.x.mê) Hedam. Endam. Navend. |
| **OrispÎ** | (hk.x.çewa) Jina/mêrê pûç. Pişt. |
| **Ormeşk** | (hk.I.çewa) Zikmeşk. |
| **Ormezin** | (hk.I.çewa) Zikmezin. |
| **Orte** | (hk.cih,x.mê) Navîn. Navincî. |
| **Osmanî** | (nbiyan.dar) Împeratorîya Osmanî ya Turkan. |
| **Oş** | (p.x) Şûş. |
| **Oşo** | (n.x.dz) Bi zarê zarokan ; ango dewar. |
| **Otax** | (n.x.mê) Mezel. Ode. |
| **Otêl** | (n.cîha.mê) Cihê hewandina mêvanan. Mêvanxane. |
| **Otoban** | (n.cîh.mê) Şarêya serekî û mezin, li navbera bajêran. |
| **Otomatîk** | (hk.cîh.çewa) Amêrên serbixwe kar di kin. |
| **Otomobîl** | (n.x.mê) tirombêl.Tumbêl. |

| | |
|---|---|
| **Otonomî** | (nbiyan.x.nêr) Hikim li xwe kirin. Xwe bi rêvebirin. |
| **Ox** | 1 (pêrb) rêzman Alavê kovan û daxê : Ax. |
| **Ox** | 2 (pêrb) rêzman Alavke jibo derbirîna xweşîyê bi kar di hêt. : Ox tu zarokek çend ciwanî !. |
| **Oxir** | (n.x.mê) Wexer. |
| **Oxir be** | (daxaz) Daxaza wexereka xweş. Daxaza serkevtinê di wexerê da. |
| **Owlî** | (nx.mê) Balkûn. |
| **Oy** | (pêrb) rêzman Alaveke jibo keser, yan janê bi kar di hêt. |
| **Oye** | (n.x.mê) Divêleyên yan pateyên nexşandî di xin klleyên landikin, çerçef û perdeyên penceran. |
| **Oyekirin** | (k.jn.l.mê) Bi oye xemilandin û nexşandina perde, kulle û çarçfan. (K) bn : Kirin. |
| **Oyîn** | (hk.çewa) Livînên bi kenî.Lêbûkî. Goyîn. |
| **Oyînbaz** | (hk.l.cewa) Mirovek zarveker, xwe bi rengan û cilikan di guhore dako xelik pê bi kenin. Lêbûk. Akrobat. |

# P

| | |
|---|---|
| **P** | (pe) Pîta nozdehê ji abeya kurdî. |
| **Pa** | 1 (pêrb) rêzman Alavcke jibo bîxistinê û pisyarê bi kar di hêt. :Pa te di got dê çîn bazarî û tu nehatî.: Seqanasan di go baran na barit, pa eve çiye?. |
| **Pa** | 2 (n.x.nêr) Pê. Ling. |
| **Pac** | (n.x.mê) Medalîya serkevtinan. Paye. |
| **Paçe** | (n.x.mê) zad Serûpêk. |
| **Paçik** | (n.dar.nêr) 1. Pêyên biçûk. 2. Tilîyên pêyan( paçika : beranî,). Pêçik. |
| **Paçîne** | (n.dar.mê) Pêstirk. Peyîsk. |
| **Paçîngeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê bilind,mîna peyîskan. Peyîsk. Girik. |
| **Padaş** | (n.x.mê) Diyarî. Qencî. Şabaş.Xelat. |
| **Padaşkirin** | (k.jn.I.mê) Xelatkirin. (K) bn : Kirin. |
| **Padîşah** | (karn ) Paşa. |
| **Pag** | (hk.cih,n.x.mê) Cihê paraztina candaran. Pêgeh. |
| **Pageh** | (n.dar.mê) Pêgeh. |
| **Pahn** | (hn.x.çewa) Pan. |
| **Pahnbûn** | (k.jn.l.mê) Panbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Pahnî** | (n.dar.mê) endaze Yekeya pîvana dûrîyê. Panî. |
| **Pahnkirin** | (k.jn.l.mê) Pankirin. (K) bn: Kirin. |
| **Paj** | (n.x.mê) Pişk. Par. Pirt. |
| **Pajne** | (n.x.mê) Panîya pêyê mirovan. Çimika pêlavê. |
| **Pak** | (hk.x.çewa) Tiştê paqij. Şûştî. Bijîn. :Maleka pak. Bajêrekê pak. :Gotineka pak.: Dilekê pak. |
| **Pakane** | (n.dar.mê) Mirov çakîyekê li kesekî di ke. Qencî. Çakî. |
| **Pakbûn** | (k.jn.I.mê) Paqijbûn. Bijînbûn. (K) bn:Bûn. |
| **Pakij** | (hk.x.çewa) Pak. Paqij. :Zarokek pakij. :Fêqîyê pakij. |
| **Pakijbûn** | (k.jn.I.mê) Pakbûn. :Ta bi sabonê neşûy, destên te pakij na bin. (K) bn: Bûn. |
| **Pakijî** | (n.dar.mê) Pakî. Paqijî. Veşûştî. . :Pakijî ji beheştê ye. |
| **Pakijkirin** | (k.jn.I.mê) Şûştin. Bijînkirin. Paqijkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Pakijkirî** | (hk.I.çewa) Tiştê şûştî. Bijînkiriî. Paqijkirî. |
| **Pakistan** | (hk.cih,cugir.n) Welatê Pakistanê. |
| **Pakistanî** | (nej,n) 1. Xelikê pakistanê. 2. Mitayê Pakistanê. |
| **Pakî** | (n.dar.mê) Paqijî. |
| **Pakîja** | (hn,hk.çewa) bn :Pakîza. |
| **Pakîte** | (n.x.mê) Amaneke ji kartonê hatî diristkirin bara pirit lakêşeye . : pakîta cigaran 20 cigare têda hene. Paket. Pakêt. |
| **Pakîza** | (hn,hk.dar.çwa) Kiça mêr nekirî. Kiç. Keç. |
| **Pakkirin** | (k.jn.I.mê) Paqijkirin. Pakijkirin. :Didanêd xwe pak bi ke. :MaI pak di kir. (K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Pal** | (n.x.mê) Beten. Kêlek. Rex. :Gundê me li pal çiyaye. |
| **Palandin** | (k.jn.x.mê) Livandin. Paldan. (K) bdn : ez di palînim em di palînîn, tu di palînî hûn di palînin, ew di palîne[ . . .it] ewan di palînin. Pr :dêbi +bdn. Bdb : di paland, di palandin. Db,dûr : palandibû, palandibûn. (F) : bi palîne, bi palînin. |
| **Palavgeh** | (hk.cih) Cih, îzgeh, kargeha palavtinê. :PaIavgeha avê. |
| **Palavte** | (n.dar.mê) Parzûnk. Fîlter. |
| **Palavtin** | (k.jn.x.mê) Parzinîn. Dapalîn. Dapalandin. (K) bn : Palêvtin. |
| **Paldan** | (k.jndarmê) 1. Dema mirov hêzê bi kar di hînit jibo livandina tiştekî ji cihekî bo yê din.2. Wekî mirov pişta xwe di dit dîwarekî, palgehekê, kevirekî û htd.(K) bdn: ez pal di dem em pal didin, tu pal di dî hûn pal didin, ew pal di de ewan pal didin..pr: ez dê paldim[pal bidim] ,...bidî, Bi din,...bi de. bdb: pal dida. pal di didan. Db,dûr: Paldabû, ... bûn. (F): palde paldin.(palbide). |
| **Paldank** | (n.dar.mê) Dîwarke mirov pala xwe di ditê. Kursîk.Kursîka hêzok. |
| **Pale** | (pîşn.x.dz) Mirovê bi kar û keda destê xwe , xwe xudan di ke. Karker. |
| **Paletî** | (kar.ndar.mê) Karkirin li karxaneyan, yan rez û baxan, ko himberî karê wî dê diravî wergirit yan hindî rojên kar kirî dê xudanê karî bo palê xwe kar kit. Karkerî. |
| **Palevan** | (pîşn.dar.dz) Pelewan. Qehreman. |
| **Palevanî** | (kam.dar.mê) Pelewanî. Qehremanî. |
| **Paleyî** | (kam.dar.mê) Paletî. Karkirin. |
| **Palêvtin** | (k.jn.x.mê) Ji hev cudakirina tiştan[madeyan], wek av û xîz, av û penîr û htd. Parzinîn. (K) bdn: ez di palêvim em di palêvîn, tu di palêvî hûn di palêvin, ew di palêve[. . .it] ewan di palêvin. Pr:[ dê] (bi) palêvim pavîn, palêvî palêvin, palêve{palêvit] . Bdb: di palaft[palavt] di palavtin.[palaftin] .Db,dûr : palavtibû, ... bûn. (F): bi palêve bi palêvin. |
| **Palgeh** | (n.dar.mê) Balgeh. Balîf. Serîn. :Pîremêrî palê xwe da bû palgehê. |
| **Palik** | (n.dar.mê) Zînê dewaran. |
| **Palpişt** | (hk.I.çewa) Alîkar. Piştevan. :Birayê wî herdem palpiştê wî ye jibo xandinê. |
| **Palpiştî** | (n.I.mê) Alîkarî. Piştevanî. :Ez pêdvî palpiştîya te me !. |
| **Palpiştîkirin** | (k.jn.gl.mê) Alîkarîkirin. |
| **Palto** | (n.cîh.nêr) Sakoyê dirêj ê zivistanê. |
| **Pan** | (hn.x.çewa) Tiştê vedayî. Xir. Ne dirêj. : Mirovekê pan. Palgeha pan. |
| **Panav** | (hk.I.çewa) Erdê bilind û serê wî rast û pan. Banî. |
| **Panayî** | (n.dar.mê) Panî. |
| **Panbûn** | (k.jn.I.mê) Têkçûn yan firehbûna şêweyê tenan. : Girikên hevîrî di destên nanpêjî da pan di bûn. (K) bn : Bûn. |
| **Panda** | (n.biyan) Giyandareka beleke, mîna hiçane. |
| **Panê** | (ngaz.mê) Navê bangkirin û naznavê jinka pan. Qelew û xir. |
| **Panî** | (n.dar.mê) endaze 1.Yekeya pîvana dûrîya şêweyan. :Panî ya pencera me 90 cm û dirêjî 240 cm. Pehnî.2. Panîya pêyê mirovan.Binê pêyê mirov û caneweran. |

| | |
|---|---|
| **Pankirin** | (k.jn.l.mê) Givanstin yan qutana tenekî ta pan bi bit. : Çiyê xwe pan kirî dê bêjî yê li mala felê xwe. (K) : Kirin. |
| **Pano** | (ngaz.dar.nêr) Bang yan naznavê zelamê qelew û pan. |
| **Pantol** | (n.x.nêr) Pentelon. Pentor. |
| **Pantor** | (n.x.nêr) Pantol. |
| **Panzdeh** | (hijn.çend) Hijmara 15. pazde. 5=10=15. :Panzdehhizar, panzdehmilyon û htd. |
| **Panzdehem** | (hijn.rêz.çend) Yê/ ya/ yên panzdehê. |
| **Panzdehemîn** | (hijn.rêz.çend) Panzdehem. |
| **Panzdehizar** | (hijn.çend.I) Hijmara 15,000. |
| **Panzdemilyon** | (hijn.I.çend) Hijmara 15,000,000 . |
| **Papoç** | (n.dar.mê) Pêlavên zarokan. |
| **Papor** | (n.x.mê) Belema mezin. Keştî. : Papora Nûhî. |
| **Paqij** | (hk.x.çewa) bn: Pakij. Pak. |
| **Paqijbûn** | (k.jn.l.mê) Pakbûn. Pakijbûn. (K)bn: Bûn. |
| **Paqijî** | (n.dar.mê) bn. Pakijî. |
| **Paqijkirin** | (k.jn.l.mê) bn: Pakijkirin.(K) bn : Kirin. |
| **Paqil** | (n.x.mê) giya Baqilk. |
| **Par** | 1 (hk.dem) Sala çûyî. Sala borî. : Par vê demê ez li Kurdistanê bûm. |
| **Par** | 2 (n.x.mê) Pişik. |
| **Parandin** | 1.(k.jn.x.mê) 1 .Parvekirin. 2. Lêkvekirin.(K) bdn : ez di parînim em di parînîn, tu di parînî hûn di parînin, ew di parîne[ . . .it] ewan di parînin. Pr : dêbi +bdn. Bdb : di parand, di parandin.Db,dûr :parandibû, parandibûn. (F) : bi parîne, bi parînin. |
| **Parandin** | 2 (k.jn.x.mê) Gazindekirin. Pareparkirin. Lavakirin. Hîvîkirin. |
| **Parasîtamol** | (n.cîh,mê) Dindikên dermanê rawestana janeser û êşanên Ieşî.(latînî ;Paracetamol). |
| **Parastin** | (k.jn.x.mê) bn :Paraztin. |
| **Parav** | 1 (hk.x.çewa) Mirovê herdem gelte, henek û pêkenînan di bêjit û ji tuxwîbî der di kevit. Şavêr. Çivêl. :Kuro ma tu ji paravîyên xwe ve nabî ! . |
| **Parav** | 2 (hk.dar.çewa) Fêqîyê bi av. Avdar. : Ev bacane gelek di paravin. Piav. |
| **Paravî** | (n.dar.mê) Gelte. Henek. Tirane. |
| **Paravîkirin** | (k.jn.I.mê) Henekkirin. Tiranekirin. ; Bes paravîyan bi ke, min gêwilê te nîne!.(K) bn :Kirin. |
| **Paravtin** | (k.jn.x.mê) Palavtin. Parzinîn. |
| **Paraztin** | (k.jn.x.mê) Dûrxistan û çavdêrîya kesek yan tiştekî, ji derd û belayan û ne hêlana zorîyê liser. : Di vêt em xwe ji nexweşîyan bi parêzîn. :Xudê welatê me bi parêze.(K) bdn: ez di parêzim em di parêzîn, tu di parêzî hûn di parêzin, ew di parêze[ ...it] ewan di parêzin. Pr: dê bi + bdn. Bdb : di parazt[parast] di paraztin[parastin]. Db,dûr : paraztibû, paraztibn. (F) : bi parêze bi parêzin. |
| **Parçe** | (n.x.mê) Ker(kher). Pirt. Pinî. :Parçeka erdî, asin û htd. |
| **Parçebûn** | (k.jn.I.mê) Ji hev cudabûn. Pirtbûn. Jêkvebûn. (K) bn: Bûn. |

| | |
|---|---|
| **Parçekirin** | (k.inlmê) Pirtkirin. Kherkirin. Hincinîn. :Perdax parçe kir. :Kaxez parçe di kirin. (K) bn: Kirin. |
| **Parçeparçe** | (hk.dar.çewa) Pirtpirt. Kerker. Hincinî. |
| **Parçeparçebûn** | (k.jn.gl.mê) Parçebûn. Pirtpirtbûn. |
| **Parçeparçekirin** | (k.jn.gl.mê) Parçkirin. Hincinîn. |
| **Pardar** | (hn,hk.dar.çewa) Pişkdar. |
| **Pardarbûn** | (k.jng.I.mê) Pişdarbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Pardarî** | (n.dar.mê) Pişkdarî. |
| **Pardarîkirin** | (k.jn.gl.mê) Pişkdarîkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Pardarkirin** | (k.jn.I.mê) Pişkdarkirin. |
| **Pardest** | (hk.I.çewa) Karbidest. Xwedî biryar. |
| **Pardestî** | (n.l.mê) Civak. Pişkdarî. Gelemperî. |
| **Pare** | (n.x.nêr) 1.Pîlek û kaxezên taybet yên bankane jibo kirîn û firotinê bi kar di hên . Dirav.Pere. :Pareyê Emrîka dolare, yê Iraqê dînar, yê Turkî lîre û htd. :Heger min pare hebane, da tombêlekê kirim.2. Mifa. Sûd. :Hindî bo te bêjin bê pareye.ang; bê mifaye, çi naçit nav mejî. |
| **Paredar** | (hk.dar.çewa) Xwedî pare. Zengîn. Heyî. |
| **Paredarî** | (n.dar.mê) Zengînî. |
| **Parek** | 1 (n.dar.nêr) Pareyê asinî. Pirtên asinî mîna peran. |
| **Parek** | 2 (n.x.mê) rêzman Pêşpirt, navpirt û paşpirt di zimanê kurdî da. |
| **Parekêşan** | (k.jn.I.mê) Kêşan yan wergirtina pareyî ji bankan. (K) bn: Kêşan. |
| **Parekirin** | (k.jn.I.mê) Vejandin. Bi biha êxistin. Bilindkirin. : Piştî cadeya gundê me qêrkirî, mitayê me hat pare kirin. (K) bn : Kirin. |
| **Parekişandin** | (k.jn.I.mê) Parekêşan. (K) bn: Kişandin. |
| **Pareperês** | (hk.I.çewa) Kesê hinde hez ji pareyî di ke, dinyadarî ji bîra wî di çe. Pareyî di perêsit. Çirîk. |
| **Pareperistin** | (k.jn.I.mê) Dema mirov pareyî ji dîn û dinyayê giringtir bi bînit. mirovatîyê ji bîr di ke. (K) bn : Peristin. |
| **Parerijandin** | (k.jn.I.mê) Weke mirov pareyî glek li karên nebaş bi mezêxit. |
| **Parêz** | (hk.x.çewa) Dema mirov ji egera nexweşî, yan qelewbûnê tuxîbekî jibo xwarina xwe di dane, ka çend û çi core zad bi xwe yan ne xwe. : Ez birincê na xom, çinkî bi parêzim. |
| **Parêzer** | (pîşn.dar.dz) Pisporê qanûnî mirovî ji gunehbarkirinê di parêze. |
| **Parêzerî** | (kam.dar.mê) Karê parêzeran. : : Pismamê min li zanîgehê j ibo parêzerîyê di xwînit. |
| **Parêzgar I** | (kam.dn) Zêrevan. Çavdêr. |
| **Parêzgar 2** | (kam.dar.dz) Serokê bajêrên mezin. Serokê parêzgehê. Serokê bajêrvanîyê. :Parêzgarê parêzgeha Duhokê. |
| | |
| **Parêzgarî** | (n.dar.mê) Paraztin. |
| **Parêzgarîkirin** | (k.jn.gl.mê) Paraztina ser û malê welatîyan. (K) bn :Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Parêzgeh** | (hk.cih,n.dar.mê) 1 . Bingehê paraztinê. 2.Cihê karê serokê bajêrî. Baregehê bajêrvanîyê.3.Bajêrên mezin yên parêzgar lê heye.:Parêgeha Duhok.Parêzgeha HewIêr.:Parêgeha Kerkok. Parêzgeha Silêmanî. |
| **Parêzgirtin** | (k.jn.I.mê) Mirov jiber qelewî yan nexweşîyê xwe ji xwarin û vexwarina hine corên zad û xoşavan di parêze. (K) bn : Girtin |
| **Parêztin** | (n.jn.x.mê) Paraztin. |
| **Parêzvan** | (kam.dar.dz) Zêrevan. Çavdêr. |
| **Parî** | (n.x.nêr) Pirteka nanî bi qayda devê mirovî bi tirsî yan di xwarinekê di hilînin yan di kene dinav da. Balolik. : Parîyek U masti da. Pend: Parîyê malbabê.; ang tam û xweşîya taybet heye. |
| **Parîkirin** | (k.jn.gl.mê) I. Parvekirin. Lêkvekirin. 2.Dirstkirina parî jibo xwarinê. |
| **Parîçêkirin** | (k.jn.gl.mê) (K) bn: Kirin. |
| **Park** | (nbiyanî x.mê) Cihê bi darûbar û dilveker jibo bêhinvedanê. Cihê rawestana tirombêlan. Bax. |
| **Parker** | (nbiyan.x.nê) Corek qelemên têkirina rengavê ye. |
| **Parlament** | (n.cîhan) Perleman. Civata nûneran. |
| **Parmend** | (karn.dar.nd) Pişkdar. : Ew jî di vê gunehê da parmende. |
| **Parmendî** | (n.dar.mê) Pişkdarî. |
| **Parole** | (n.dar.mê) Dirûşim. Drî. |
| **Parolebilindkirin** | (k.jn.gl.mê) Bilindkirina paroleyan : Li ne\yrozê kurdan li derve û Kurdistanê, bi hizaran parole bilind di kirin ko têda daxaza aşti û azadîyê di kirin. |
| **Paronek** | (n.dar.dz) Golik. Mêgank. |
| | 491 |
| **Parpêv** | (n.dar.mê) Civat. |
| **Parsal** | (hk.dem.I) Par. Sala çûyî . Salapar. : Parsal ez li Derveyî welatî bûm. |
| **Parsek** | (n.x.dz) Xazok. Çeqrût. |
| **Parseng** | (n.I.mê) Giranî. Seng. Pîvan. |
| **Parskirin** | (k.jn.I.mê) Xaztin. Xazokîkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Part** | (n.x.mê) Parçe. Bir. Ref. Deste. |
| **Partî** | (n.x.mê) 1 .Desteyeka ramyarî[siyasî] .2. Partîya Demokrat a Kurdistanê.PDK. |
| **Partîzan** | (n,biyan) Çekdareke li devera xweya bindest dijî dujminan xebata çekdarî di ke. Gerîle. |
| **Parvekirin** | (k.in.I.mê) Pişkkirin. Lêkvekirin. : Evro xwarin li ser malên hejaran hat parvekirin. (K) bn : Kirin. |
| **Parveldrî** | (hk.dar.çewa) Lêkvekirî.Pişkkirî. |
| **Parzemîn** | (n.dar.mê) Tepa erdî. |
| **Parzinîn** | (k.in.x.mê) Mast, dew, penîr û htd, li patekî di ken dako av jê bi hêt girtin .Palavtin. Bêrîvanê şîr parzinî ; ang; li tûrkî kir da ji gilêşî pak bi be. (K) bdn: ez di parzinim em di parzinîn, tu di parzinî hûn di parzinin, ew di parzine[...it] ewan di parzinin. Pr:dê [bi] parzinim, parzinîn, parzinî, |

| | |
|---|---|
| | parzinit. Bdb : di parzinî, di parzinîn. Db,dtir: parzinîbû, parzinîbtin.(F) : bi parzine bi parzinin |
| | |
| | |
| **Parzinînk** | (n.dar.nêr) Amêreke ji pero yan moxilê hati diristkirin ji bo parzinîna şîr, penîr ça û htd. |
| | |
| **Parzîn** | (n.x.nêr) Cantek[cihtirek] nemazeye ji bendikên hirîyê yên rengereng hati ye çêkirin, şêweyê sêkujî ye, jin di êxin pişta xwe, meşka şîrîûkelûpelên din tê di ken jibo veguhastinê ji mal bo aqarî û berevajî. |
| **Parzînkirin** | (k.jn.I.mê) Parzinîn. (K) bn: Kirin. |
| **Parzûn** | (n.x.nêr) Parzinînk. Filter. |
| **Parzûnkirin** | (k.jn.I.mê) Parzînkirin. |
| **Pasban** | (pîşn.dar.dz) Zêrevan. Çavdêr. |
| **Pasevan** | (pîşn.dar.dz) Pasban. |
| **Paşîk** | (n.x.mê) Cihê vekirî. Banî. Erdê bilind. Basik. |
| | 492 |
| **Paşport** | (n, biyan.mê) Giroveka nivêsî ya taybete, mirov di kare bi wê, ji welatî bo yê din biçe. Paseport. |
| **Paş** | (hk.dem) Pişt. Pişti. Dawî. Dûmahî. Şûnda. :Paş deh salan dê rewşa aborî li Kurdistanê gelek geş bit. Brx Pêş. |
| **Pşa** | (pîşn.x.dz) Kesê piştê şahî di bit şah. Cihgirê şahî. Şa. Kiral. |
| **Paşan** | (hk.dem) Paş. |
| **Paşandin** | bdn: ez di paşînim em di paşînîn, tu di paşînî hûn di paşînin, ew di paşîne[...it] ewan di paşînin. Pr: dêbi +bdn. Bdb : di paşand, di paşandin.Db,dûr :paşandibû, paşandibûn.(F) : bi paşîne, bi paşînin. |
| **Paşatî** | (kam.mê) Welatê ko deshelata wî paşayî be.Karê paşayan. |
| **Paşayî** | (pîşn.dar.dz) Paşatî. |
| **Paşbend** | (n.dar.mê) rêvnan Paşpirt. Paşgir. Brx Pêşbend. |
| **Paşbêi** | (hk.dar.çewa) Kesê li pişt [ango ne li nik mirov] bi ne çakî behsê mirovî di ke. Durû. |
| **Paşbêjî** | (n.dar.mê) Wekî mirov dijî yekî gotinên kirêt bi bêje û dema ne cem mirovî. |
| **Paşdank** | (n.dar.mê) Rêzman Paşbend. |
| **Paşda** | (hk.dar.çewa) Paşve. Li paş. |
| **Paşdabirin** | (k.jn.gl.mê) Paşve zivirîn. Paşve kêşan. Paşve bizivîn. : Tirombêla xwe pîçek paşda bi be, da cihê ya min jî liebe.(K) bn: Birin. |
| **Paşdaçûn** | (k.jn.gl.mê) Paşveçtin. Jibo alîyê piştê vegerîn.Paşveçûn. ; Dujimin jiber gurzên kujekên pêşmergehan paşda çtin. (K) bn: Çûn. |
| **Paşde** | (hk.dar.çewa) Paşda. |
| **Paşdir** | (hk.dar.çewa) Segê har. Segê kulana yê dirinde. |
| **Paşecar** | (hk.I.çewa) Cara paşin. Kurt û kirmancî. Li dawîyê. Cara domahîkê. |
| **Paşel** | (n.x.mê) Paxil. Sing. |

| | |
|---|---|
| **Paşeroi** | (hk.dem.l) Demûrojên di hên. (Li hin devaran dem û rojên derbaz bûne). : Em daxaza paşerojeka geş jibo gelê xwe di kin. |
| | 493 |
| **Paşewar** | (pîşn.dar.dz) Lêger. Vekoler. |
| **Paşê** | (n.dem) Paşî. : Paşê waneya me bi dawî di hêt em dê herin mal. |
| **Paşgir** | (hk,cih.mê) Rêziman Pirta dawîya tiştî yan peyvê digirit. Paşpirt. Paşbend. Mîna van ji Darvan. Gir ji zêrgir. Geh ji Havîngeh. ker ji karkerûhtd. |
| **Paşgotin I** | (n.I.mê) Gotina dawîyê. Peyva domahîyê. |
| **Paşgorin 2** | (n.I.mê) Paşbêjî. |
| **Paşil** | (n.x.mê) Paxil.Sing. ::Du dînar di paşila wî da hene. |
| **Paşilpîş** | (hk.I.çewa) Çepel. Lewçe. Ezmandirêj. |
| **Paşî** | (hk.dem) Paş. |
| **Paşîberdan** | (k.jn.I.mê) Kevtin dû karekî, kesekî yan dozekê. |
| **Paşîhatin** | (kjn.I.mê) bi Dawîhatin. Kutakirin. Kutabtin. Bi Domahîk hatin. |
| **Paşîn** | (hk.dar.çewa) Ya/yê/yên domahîyê. Dawîyê. :Meha, roja cara paşîn. |
| **Paşîv** | .(n.I.mê) Xwarina diregî şev li cem rojîgiran. Xwarina direng. :Paşîv xwar û rojî ne girt. |
| **Paşkevtin** | , paşketin (k.jn.I.mê) Gîrobûn. Paşveman. Paşdaman. (K) bn: Kevtin. |
| **Paşkevtî** | ketî (hk.I.çewa) Mirovê xwedî hizir û bîrên kevin û kevineperist û paşvemayî. |
| **Paşnîvro** | (hk.dem.gl) Piştî nîroj. Nîro.Paşnîvroj. Êvar. |
| **Paşperde** | (hk.I.çewa) Bûk înan. Veguhaztina bûkê. |
| **Paşpê** | (hk.l.çewa) Piştûpişt. Berevajî. |
| **Paşpêbûn** | (k.jn.gl.mê) Berevajîbûn. |
| **Paşpêldrin** | (k.jn.gl.mê) Berevajîkirin. |
| **Paşpirt** | (hk,cih.mê) bn: Paşgir.Paşbend. |
| **Paşrojmendî** | (n.l.mê) Paşerojeka geş ji xwe ra misogerkirin, bi malkirmûdirav civandinê. |
| **Paşye** | (hk.dar.çewa) Paşda. |
| **Paşvebirin** | (k.jn.l.mê) Piştûpişt birin. Lê heytandin.Paşdabirin. : Kuro ma tu fedî na kî hinde di hêye paşvebirin. (K) bn : birin. |
| | 494 |
| **Pasveçûn** | (k.jn.I.mê) Jibo alîyê piştê bizivîn. (K) bn: Çûn. |
| **Paşveman** | (k.jn.I.mê) Paşkevtin.(K) bn: Man. |
| **Paşvemayî** | (hk.I.çewa) Paşkevtî. |
| **Paşvero** | (hk.I.çewa) Paşkevtî. Kevinperist. |
| **Paşxwarin** | (n.I.mê) Zadê giranûgerim, mîna goşt, mirîşk, birinc,savar, metfînî û htd yê li dû xwarina sivika(pêşxwarm) wek avik, zelate piçek nanûhtd, di hêt xwarin. Zadê serekî. |
| **Pate** | (n.x.nêr) 1 .Perok. Parçe perok. 2. Pinî. Pîne. |
| **Patekirin** | (k.jn.l.mê) Pînekirin. Pinîkirin. : Kuna kiraskê xwe li cem cildirûvanî da pate kirin. |
| **Patekirî** | (hn.I.çewa) Pînekirî. Pinîkirî. : Derpêyê patekirî. Sakoyê patekirî. |
| **Patexwer** | (hk.I.çewa) Xwefîroş. Dardestê dujminî. |

| | |
|---|---|
| **Patik** | (n.x.mê) candarî Parçeyeka leşîye ya di kevit navbera ser û pişta mirov û giyandaran.alê piştê yê sitoyî. |
| **Patin** | (k.jn.x.mê) bn: Pêjtin. Pend : Nan patin û kezwan kelotin. |
| **Patirî** | (n.x.mê) Tenekê lûleyî, pan sêkujî û htd ji bireka dîyarkirî a karebê pêkhatf ye, jibo karkirina radyo, kilçan, demjimêr û htd bi kar tê. Pîl. |
| **Patî** | (hk.dar.çewa) Hatî patin. : Nê patî . |
| **Patpatik** | (n.dar.mê) Tiveng û debance yên zarokan. Teqteqok. |
| **Pavan** | (n.x.dz) Pişkdarê di yarîyê da. Lîstikvan. Yarîvan. |
| **Pawan** | (n.x.nêr) Daristan yan cihê çerwanê pezî, taybet yê malekê yan gundekî ko nabit çi kes û candar nêzî bibin, ji bilî yê xwedî û dema pêvî. Kûz. Çerwan. Çerdan. |
| **Pawankirin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov cihekî bi ke pawan. (K) bn: Kirin. |
| **PaxiL** | (n.x.mê) Cihê tiştî tê hildigirin navbera kiras û şîtika mirovî yan navbera du kirasan[cilkan] alîyê singî. :Bapîrê min kîskê xwe kire di paxila xweda. Paşil. |
| **Paydar** | (n.l.mê) Ciyê ko siwarê paysiklê pêyên xwe li ser di dane û di zivrîne dako bi hajtût. |
| **Paye** | (n.x.mê) Mezin. Gewre. Rûmet.Pile. |
| | 495 |
| **Payebilind** | (hk.l.çewa) Xwedî paye. Sentenet. Piledar. |
| **Payedar** | (hn,hk.dar.çewa) Piledar. Xudan sentenet. |
| **Payîz** | (hk,dem.mê) Werzekê salê ye ji mehên îlûn, çirya êke û çirya duwê pêk hatf ye. Xezam. Pend : Mastê payîzan bi din ezîzan. |
| **Paysikil** | (n.x.mê) Core amêreke mirov lê siyar di be û bi lêdana paydaran di hajût. Kerkê asinî. |
| **Paytext** | (bajam.nêr) bajêrê serok yan şa lê di mînit. Her welatekî paytextê xwe heye. Bexda paytextê Iraqê ye. |
| **Pazde** | (hijn.çend) Pazdeh. Panzdeh. |
| **Pazdeber** | (n.l.mê) Lîztika damanê. |
| **Pazdeh** | (hijn.çend) Hijmar 15. panzdeh. |
| **Pazdehem** | (hij,dest) Ya,yêyên pazdehê. |
| **Pazdehemîn** | (hijn.dest) Pazdehem. |
| **Pazdehizar** | (hijn.I.çend) Hijmara 15,000. |
| **Pazdemilvon** | (hijn.I.çend) Hijmara 15,000,000. |
| **Pazen** | (n.x.mê) Çarçef |
| **PDK** | (kurtn) Partîya demokrata Kurdistanê. |
| **Pe** | (n.x.mê) Pîta P. Lêvkirina pîta P. |
| **Peç** | (hk.x.çewa) Feç. |
| **Peçe** | (n.x.mê) Pêçe. |
| **Peçê** | (hn gaz.dar.mê) Feçê. |
| **Peçinîn** | (k.jn.x.mê) Nixavtin. : Zadî, fêqî bi peçine.(K) bdn: ez di peçinim em di peçinîn, tu di peçinî hûn di peçinin, ew di peçine[....it] ewan di peçinin. pr : dê[bi] peçinim, peçnîn, peçinî, peçnin, peçimt. Bdb: di peçinî, di peçinîn. Db,dûr: peçinîbti,peçinîbûn. (F): bi peçine, bi peçinin. |

| | |
|---|---|
| **Peço** | (gazn.nêr) Feço |
| **Pegirandin** | (k.jn.x.mê) Bijînkirin. Jaravkirin. Şûştin. (K) bdn : ez di pegirînim em dipegirînin, tu di pegirînî hûn di pegirînin, ew di pegirîne[...it] ewan di pegirînin.Pr :dêbi+bdn. Bdb : di pegirand, di pegirandin. Db,dûr : pegirandibû, pegirandibûn.(F) : bi pegirîne,bi pegirînin. |
| **Pehin** | (hn.x.çewa) bn: Pan. |
| | 496 |
| **Pehinbûn** | (k.jnl.mê) Panbûn. |
| **Pehinî** | (n.dar.mê) endaze Panî. |
| **Pehinkirin** | (k.jnl.mê) Pankirin. |
| **Pehîn** | (n.x.mê) 1 .Panîya pêyê mirovî.2. Peyîsk. |
| **Pehlewan** | (n.I.dz) Mirovê leşsivik û bi ser rist, têle û cihên bilind ra derbaz di bit. Canbaz. |
| **Pehnî 1** | (n.x.mê) endaze bn: Panî. : Pehnîya banê xanî 70 m2. |
| **Pehnî 2** | (n.x.mê) can Panîya pêy. |
| **Pejare** | (n.x.mê) Xem. Kovan. |
| **Pejilandin** | (k.jn.x.mê) Perçiqandin. Ji nav birin. Herişandin.(K) bdn: ez di pejlînim em di pejilînîn, tu di pejilînî hûn di pejilînin, ew pejilîne[...it] ewan di pejilînin. Pr:dêbi +bdn. Bdb : di pejiland, di pejilandin. Db,dûr :pejilandibû, pejilandibûb. (F) : bi pejilîne, bi pejilînin. |
| **Pejin** | (n.x.mê) Saloxdan. Nirxandina mirov, kar û tiştî.Çewanîya tişt, mirov û htd. |
| **Peûnandin I** | (k.jn.x.mê) Nav lê dan. Nav li xwe dan. Bilindkirin. Serêxistin.(K):bdn: ez di pejinînim em di pejinînîn, tu di pejinînî hûn di pejinînin, ew di pejinîne[...it] ewan di pejinînin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : di pejinand, di pejinandin. Db,dûr :pejinandibû, pejinandibûn. (F) : bi pejinîne, bi pejinînin. |
| **Pejinandin 2** | (k.jn.x.mê) Ta û çeqên daran jêkirin da jibo barî û sotinê hilû û dest xweş bin. Kejaxtin. Perjinandin. Veperjandin. |
| **Pejirandin** | (k.in.x.mê) Kar, biryar û bûyerên mirov yan dezgeh liser razî be û were bi cî anîn. Qayîlbûn liser. :PerIemanî birayara civata wezîran pejirand. (K) bdn: ez di pejirînim em di perjirînîn, tu di perjirînî hûn di pejirînin, ew di pejirîne[. Jt] ewan di pejirînin.. Pr : dê [bi] pejirînim pejirînîn, pejirînî, pejirîne(nit). Bdb: di pejirand, di pejirandin. Db,dûr: pejirandibû,pejirandibtin. (F): bi pejirîne bi pejirînin |
| **Pejî** | (n.x.mê) derd Nexweşîyeka Vegir. Persîv. Serma. |
| **Pek** | (pêrb) rêziman Alaveke jibo hicmetîbûnê bi kar di hêt. : Pek eve pileyên tene hosa di bilind ?. |
| **Pekkevtin** | (k.jn.dar.mê) Kesê hedamekê leşê wî seqet[leng] bit. Kêmhedam. |
| | 497 |
| **Pekkevtî** | (hn,hk.I.çewa) Kêmhedam. Seqet.Lenger. |
| **Pekko** | (pêrb) rêzman bn : Pek. |
| **Pel 1** | (n.x.mê) Pirtên daran li dema şewitînê geşûsor xuya di kin, jibo gerimkirin û lênana zadî mifa jê di hêt wergirtin. |
| **Pel 2** | (n.x) Ta. Çeq. :Pelên daran. |

| | |
|---|---|
| **Pela** | (n.x.mê) Tava baranê. |
| **Pelakevtin** | (k.jn.l.mê) Di erdî da çûna baranê. Nimana erdî jiber baran û befirê :Pela gêsnî ya ketf. Ang ; hindî gêsnî ax ter bûye. : Pela gorî.ang; hindî ktirîya gorî baran çûye xwar.(K) bn:Kevtin. |
| **Pelandin** | (k.jn.x.mê) Dest lêdan. Hembêzkirin. Perixandin. Hilûkirin. Şekirin.(K) bdn :ez di pelînim em di pelînîn, tu di pelînî hûn di pelînin, ew di pelîne[...it] ewan di pelînin.Pr :dêbi+bdn. Bdb : di peland, di pelandin. Db,dtir :pelandibû, pelandibûn. (F) bi pelîne, bi pelînin |
| **Pelatînk** | (n.dar.mê) candar Giyandrekê ciwan û rengîne, li biharan pirin û liser gul û giyayan dijîn. Pelîtank. Belatînk. Pelatînk |
| **Pelay** | (n.x.mê) xwarin Zadek taybete ji du yan pitir xwarinên têkel di hêt çêkirin. |
| **Pelavmaş** | (n.l.mê) xwain Pelava ji birinc û maşan pêk hatî. |
| **Pelavnîsk** | (n.l.mê) xwarin Pelava nîsk û birincê Yan savar û nîsk. |
| **Pelax** | (n.x.nêr) Pelex. |
| **Pelçiqandin** | (k.jn.x.mê) bn :Perçiqandin. |
| **Peldank** | (n.dar.mê) Cizdank. Perdank. |
| **Peiç** | (hk.x.çewa) Lez. |
| **Pelekirin** | (k.jn.I.mê) Lezkirin. |
| **Pelemar** | (n.dar.mê) Hêriş. |
| | 498 |
| **Pelemardan** | (k.jn.I.mê) Hêrişkirin. |
| **Pelendar** | (n.dar.nêr) Bizot. GuUetiveng. Fîşeka gurîyê. |
| **Pelepel** | (hk.x.çewa) Gav bi gav. |
| **Pelepelkirin** | (k.in.l.mê) Gav bi gav xwe ji astengîyekê qurtal bi kin. (K) bn : Kirin. |
| **Pelepife** | (n.dar.ê) Nanê tenikê liser pelan qelandî. Qelqeloşk. |
| **Pelex** | (n.x.nêr) Bermayî yê darik, pîş û belgan. |
| **Pelg** | (n.x.mê) dar Dareka bi xemil û keske, liser lêvêd co û ceman hişîn di bit. Pend :Sîbera pelgê, ne li xwe û ne li xelkê. Ang ; kesê ne kêr xwe û ne bi kêr kesê dî na hêt. Mirovê bêsûz. |
| **Pelijîn** | (k.jn.x.mê) Bizivîn. Xebitîn. (K) bdn: ez di pelijim em di pelijîn, tu di pelijî hûn di pelijin, ew di pelije[...it] ewan di pelijin. Pr:dêbi +bdn. Bdb : ez di pelijîm em di pelijîn, tu di pelijî hûn di pelijîn, ew di pelijî ewan di pelijîn.Db,dûr :ez peljîbûm em pelijîbûyn, tu pelijîbûy hûn pelijîbûn, ew pelijîbû ewan pelijîbûn. (F) : bi pelije, bi pelijin. |
| **Pelik** | (n.x.nêr) darûbar Belg. |
| **Peling** | (n.dar.mê) Peyîsk. Pêstirk. |
| **Palişandin** | (k.jn.x.mê) Têkbirina şêweyê madeyan nemaze req. Perçiqandin. :Teneke pelişand. (K) bdn: ez di pelişînim em di pelişînîn, tu di pelişînî hûn di pelişînin, ew di pelişîne[...it] ewan di pelişînin. Pr:dê bi + bdn.Bdb: di pelişand, di pelişandin. Db,dû pelişandibû, pelişandibûn. (F) bi pelişîne, bi pelişînin. |

| | |
|---|---|
| **Pelişîn** | (k.jn.x.mê) Têkçûna şêweyê teyan bi givaştinê. Herişîn. : Xirxalên tirombêlê pelişîn. : Selik di bin barî ve pelişî. Pelişqe (hk.I.çewa) Kêrnehati. Pûç. Kevin. Periti. Bêwic. |
| **Pelişqebûn** | (k.jnlmê) Pûçbûn. (K) bn : Bûn. |
| **Pelişqekirin** | (k.jn.I.mê) xirakirin. Pûçkirin. (K) bn :Kirin. |
| **Pelixandin** | (k.jn.x.mê) Leş, ten yan tiştê şêweyê wî têkçûyî dema hêz yan givaştinek di keve ser. Herişandin. (K) bdn:ez di pelixînim em di pelixînîn, tu di pelixînî hûn di pelixînin, ew di pelixîne[....it] ewan di pelixînin. Pr: dê[bi] pelixînim pelixînîn, pelixînî pelixînin, pelixînit[ne]. Bdn : di pelixand , di pelixandin.db,dûr: palixandibû,pelixandibûn. (F) : bi pelixîne, bi pelixînin |
| | 499 |
| **Pelixîn** | (k.jn.x.mê) Tiştê hati pelixandin. :Hindî min karê kirî ezê pelixîm. (K) bdn: ez di pelixim em di pelixîn, tu di pelixî hûn di pelixin, ew di pelixe[..it] ewan di pelixin. Pr : dê [bi] pelixim pelixîn, pelixî pelixin, pelixit[xe]. Bdb : ez di pelixîm em di pelixîn.tu,ew di pelixî, hûn ,ewan di pelixîn, Db,dtir: pelixîbti, . . .bûn. (F) : bi pelixe bi pelixin. |
| **Pelîka** | (hk.x.cewa) Behane. Hêcet. |
| **Peiît** | (hk.x.çewa) Felîte. Kolanî. Kêmehatî. |
| **Pelîtank** | (n.dar.mê) bn: Pelatînk. |
| **Pelîtûç** | (n.l.mê) Pirt. Parçek pateyî. : Pelîtikên befirê yên di hên. Pelîtika lempê, çirayî, fanosê. |
| **Pelp** | (n.x.mê) Behane. |
| **Pelpîne** | (n.x.mê) giya Pêrpîne. |
| **Pembe** | (hn.x.çewa) reng Rengê pîvazî. |
| **Pembî** | (n.x.nêr) giya I.Giyayeke di hêt çandin berê wî jibo perokan mifa jê di hêt wergirtin.2. Berê giyayê penbî ye reng sipî û nerme. |
| **Pembû** | (n.x.nêr) bn : Pembî. |
| **Pembûjen** | (kam.dar.dz) Kesê pembû di veçirit.Kwîrinc. |
| **Pambûjenîn** | (k.jn.I.mê) Veçirîna pembî. (K) bn: Jenîn. |
| **Pena** | (n.x.mê) Hewar. Daxaz. Hîvî. |
| **Penaber** | (hk.I.çewa) Yê hewara xwe di gehînit welat, alî yan kesekî dako canê wî ji belayê bi hêt paraztin. |
| **Penageh** | (hk.cih.mê) Cihê, welatê hewandina penaberan. Wargeha penaberan. Hewangeh |
| **Penaxaz** | (hk.I.çewa) Yê penayê ji cih yan welatekî di xaze. |
| **Penaxaztin** | (k.jn.I.mê) Daxazkirina hewandinê ji alîyekî. |
| **Penc** | (n.x.mê) Nînokên dirêj û tîj , nemaze yên giyandaran, wek; kitik, seg, şêrûhtd. |
| **Pencbaz** | (hn.I.çewa) Mirovê hez ji arêşe û cireyan di ke. Çeqeloz. Mûçirk. şûm. |
| **Pencdanan** | (k.jn.l.mê) Mirov yan candar bi pencan H yekî bi xin. Penc lê dan. :Kitikê pencek li destê zarokî da. :Hişyar be, ew pişîk pencan di dane. (K) bn: Danan. |

| | |
|---|---|
| **Pencer** | (n.x.mê) Ciheke li dîwaran bi caman ava kirîye jibo ronahî û ba bi jor bi keve. |
| **Penceşêr** | (n.l.mê) derd Nexweşîyek kujeke,di bite egera êvitîna leşê saxlem û kujtina wî. |
| **Pencik** | (n.dar.mê) Penc. |
| **Pencikkirin** | (k.jn.l.mê) Pencdanan. |
| **Pencirîk** | (n.dar.mê) Lêdana pencan. Cihê bi pencan verûşandî. Quncirîk. |
| **Pend** | (n.x.mê) Gotinên bi biha . şîretên mezinan. :Pendêd pêşînan.:Gotinêd mezinan. |
| **Penddan** | (k.jn.l.mê) şîretkirin. |
| **Pendî** | (hk.x.çewa) Xuya. Diyar. Berçav. |
| **Pendvan** | (kar.ndar.dz) şîretvan. |
| **Peng** | (hk.x.çewa) Rawestayî. Bêdeng. Neliv. |
| **Pengav** | (hk.cih,n.l.mê) Cihê av lê di pengit, çi xuristî yan dîwarkirî bit. Bendav. Sikir. |
| **Pengîn** | (k.jn.x.mê) Dema av yan her şileyek ji egera rê lê girtinê li ser hev xirve [kom] di bit. Av di pengit. Xwîn di pengit. |
| **Penî 1** | (hk.cih) li Pişt. Berîve. :Gundê me di kevit penî wî girê henê.ang; pişt girê han. |
| **Penî 2** | (hk.x.çewa) Xuya. Vekirî. Aşkera. Brx Nepenî. |
| **Penîr** | (nx.nêr) spîyatî Berhemek giyandarî ye, ji xwarinên rêçalî ye. şîrê kelandî hêvên di ken û paşî di xin nav perokekî giranîyekê li ser di danin dako ji avê vewerit û nîvreq bi bit. |
| **Pentol** | (n.x.nêr) Pentelon. Pentor. şelwalê teng. |
| **Pep** | (n.x.nêr) Pê bi zarê zarokan. |
| **Pepexa** | (nbiyan.x.mê) Tûtî. |
| **Pepez** | (n.x.mê) 1. Kartên leystinê.2. Core leystineke bi kartên taybetî di hêt kirin. |
| **Pepezanê** | (n.dar.mê) Lîstina bi pepezan. Kartan. |
| **Pepûk 1** | (n.x.mê) balende perinde Teyereke (balinde) dengê xwandina wî wek navê wî ye, ango navê wî ji dengê wî hatîye wergirtin. |
| **Pepûk 2** | (hk.x.çewa) Reben. Jar. Damayî. |
| **Peq** | (n.x.mê) Derza mezin. Kelişte. :Peqên levtîne erdî ji ber hişkesalî yê. |
| **Peqandin** | (k.jn.x.mê) 1.Tişkek yan tenekî bi pestanê[givaştin] yan her karekê din ko bi be egera têkdana şêweyê wî û deng jê peyda di be. Teqandin. : Zarokî pivdanka xwe bi didanan peqand. 2. Qutaneka mezin. Lêdan, lêxistin. (K) bdn: ez di peqînin em dipeqînîn, tu di peqînî hûn di peqînin, ew di peqîne[....it] ewan dipeqînin.. Pr : dê[bi] peqînim peqînîn, peqînî peqînin, peqînit[ne]. Bdb: di peqand, di peqandin. Db,dûr: peqandibû,peqandibûn. (F): bi peqîne bi peqînin. |
| **Peqbûn** | (k.jn.l.mê) Peqîn. :Erdê bûye peq. :Lêvêd wî yê bûyne peq. |
| **Peqik** | (n.dar.mê) Kulik. Vilik. Bilqik. |
| **Peqilk** | (n.dar.mê) Pivildank. Peqşk. |
| **Peqîjok** | (n.dar.mê) Peqilk. Peqik. |

| | |
|---|---|
| **Peqîn** | (k.jn.x.mê) Tenê şêweyê wî têk di çit û deng jê di hêt. Pivdank peqî. :Hind mabû ez ji kerbada bi peqim.(K) bdn: ez dipeqim em di peqîn, tu di peqî hûn di peqin, ew di peqe[…it] ewan di peqin. Pr: dê[bi] peqim peqîn, peqî peqin, peqit. Berd,b: di peqî, di peqîn. Db,dûr: peqîbû, peqîbûn. (F): bi peqe, bi peqin. |
| **Peqîşk** | (n.x.mê) 1. Pivdankên biçûk yên ba tê, wek bilqkên avê, sabûnê û htd. 2. Cihek vala, yan xulole. : Peqîşka kezwanê. : Destên min peqîşkên lê hatîn jiber bivrî. |
| **Per** | (n.x.nêr) 1.Tiştê nerim yê ko leşê balindan da di poşit. 2. Kaxez. 3. Cilik[perok].4. Belg. |
| **Perandin** | (k.jn.x.mê) Derbazkirin. |
| **Perasî** | perasû (n.x.mê) can Rêze hestîyên leşî ne yên sebeteya singî pêk di hînin. |
| **Perasîperasî** | (hk.l.çewa) Tişt yan cihê wek şêweyê perasîyan rêzkirrî[darijtî], ango nizimî û bilindî heye. :Dîwar yan kevir ê perasîperasî. |
| **Perasîstûr** | (hk.l.çewa) Difinbilind. Xweperês.Nijadperês. |
| **Perav** | (hk.cih,n.l.mê) 1. Lêva avê. Kinar. 2. Pêlên avê. |
| **Percan** | (n.dar.mê) Perjan.Tan. Kotan. |
| **Perç** | (n.x.mê) Peqik. |
| **Perçe** | (n.x.mê) bn: Parçe. |
| **Perçem** | (n.x.mê) 1. Por. Pirç. :Awayî şekirina porê. 2. Pora pêşîya serî li hindav enîyê. Temborî. |
| **Perçiqandin** | (k.jndarmê) 1.Dema mirov tiştekê nîvreq bi herişînit.2. mafên xelkî binpê bi ket.(K) bdn :ez di perçiqînim em di perçiqînîn, tu di perçiqînî hûn di perçiqînin, ew di perçiqîne[...it] ewan di perçiqînin.. Pr: dê [bi] perçiqînim perçiqînîn, perçiqînî perçiqînin, perçiqînit. Berd,db: di perçiqand, di perçiqandin. Db,dûr : perçiqandibû,perçiqandibûn. (F): bi perçqîne, bi perçiqînin. |
| **Perçiqandî** | (hk.dar.çewa) Bi dest yan hêzekê tişt hatîye perçiqandin. Herişandî. |
| **Perçiqî** | (hk.dar.çewa) Herişî. Hatî perçiqandin. :Bacanêd perçiqî. :Tirîyê perçiqî. |
| **Perçiqîn** | (k.jn.x.mê) Tiştek ji egera givaştinekê bi herişit.(K) berd,dn : ez perçiqîm em perçiqîn, tu perçiqî hûn perçiqîn, ew perçiqî ewan p Pr: dê[bi] perçiqim perçqîn, perçiqî perçqin, perçiqit. Ber,db : di perçiqî, di perçiqîn. Db,dûr : perçiqîbû, ... bûn. (F): bi perçiqe, bi perçiqin. |
| **Perçivandin** | (k.jn.x.mê) Êvitandin. Pifkirin. : Wî çavêd xwe bi xewê perçivandin.(K) bdn : ez di perçivînim em di perçivînîn, tu di perçivînî hûn di perçivînin, ew di perçivîne[...it] ewan di perçivînin. Pr : dê[bi] perçivînim, perçivînîn, perçivînî, perçivîn, perçivîne.Bdb : di perçivand, di perçivandin. Db,dûr : perçivandibû, perçivandibûn. (F) : bi perçivîne, bi perçivînin. |
| **Perçivîn** | (k.jn.x.mê) Êvitîn. Werimtin..(K) bdn: ez di perçivim em di perçvîn, tu di perçivî hûn di perçvin, ew di perçve[...it] ewan di perçivin. Pr : dê[bi] perçivim, perçvîn, perçivî, perçvin, perçive[vit]. Bdb : ez di perçivîm, em di perçvîn,tu di perçivî, hûn, ewan di perçivîn, ew di perçivî. Db,dûr :ez |

| | |
|---|---|
| | perçivîbûn, em perçivîbûyn, tu perçivîbûy, hûn, ewan perçivîbûn, ew perçivîbû. (F) : bi perçive, bi perçivin. |
| **Perçîn** | (n.dar.mê) Amêreke jibo asêkirina kaxezan bi derzîkan. |
| **Perçînkirin** | (k.jn.l.mê) Dema bi derzîkên asinî bi makîna perçînê kaxezan bi yek ve di bestin. :Mêvanî bi perçînê deftera xwe perçîn kir.(K) bn : Kirin. |
| **Perdax** | (n.x.mê) Kopê avê, çayê. :Perdaxeka çayê. :Av bi perdaxê vexwar. |
| **Perde** | (n.x.mê) Parçe peroyeke di êxin penceran yan di ken navbir jibo parastin, ciwanî û ji hev cudakirinê. :Perdeya pencerê. |
| **Perdekirin** | (k.jn.l.mê) Perde êxistin pencer, navmalek yan her cihek din. :Em rojê hemîyê mijûlî perdekirina penceran bûyn. (K)bn: Kirin. |
| **Perdekirî** | (hk.l.çewa) Hatîye perdekirin. : Dîwarê perdekirî. |
| **Perdepoş** | (hk.l.çewa) Bi perdeyan hatî girtin. Perdekirî. |
| **Pere 1** | (n.x.nêr) Pûte. Giringî. |
| **Pere 2** | (n.x.nêr) Pare.Dirav. |
| **Pereng** | (n.dar.nêr) Agir. Gurîya agirî. |
| **Perepêdan** | (k.jn.l.mê) bn: Giringîpêdan. |
| **Peresendin** | (k.jn.dar.mê) Pêşkevtin. Werarkirin. |
| **Peresêlik** | (n.l.mê) Hacîreşk. |
| **Perêstin** | (k.jn.x.mê) 1.Mirov xwe jibo pîrozîyekê, tiştekî, canekî bi tewîne û nivêj û nizayê ji wîra bike. :Xudê peristin. :Pot peristin. 2. Nûkerîkirin. (K) bdn :ez di perêsim em di perêsîn, tu di perêsî hûn di perêsin, ew di perêse[..sit] ewan di perêsin.Pr:dê[bi] perêsim perêsîn, perêsî perêsin, persit,..[se]. Bdb: di perist, di peritin. Db,dûr : peristibû, peristibûn. (F): bi perêse, bi perêsin |
| **Pergal** | (n.dar.pir) Kelûpel. Alav. |
| **Pergar** | (n.dar.mê) Pilan. Nexşe. |
| **Pergeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê firotina pergalên nivêsînê, wek kaxez, qelem, defter, jêber, qelemtiraş û htd. |
| **Pergihandin** | (k.jn.dar.mê) Pêçan. Destik kirin. Liser hev rêzkirin. : Hemû kitêb û badek ên xo di refikan da pergihandin.(K) bdn : ez di pergihînim em di pergihînîn, tu di pergihînî hûn di pergihînin, ew di pergihîne[...it] ewan di pergihînin. Pr :dêbi +bdn. Bdb : di pergihand, di pergihandin. Db,dûr : pergihandibû, pergihandibûn.(K) bi pergihîne, bi pergihînim. |
| **Perginde** | (hk.dar.çewa) Peritî. Belavbûyî. Bijale. |
| **Pergindebûn** | (k.jn.l.mê) Belavbûn. Perçebûn. (K) bn: Bûn. |
| **Pergindekirin** | (k.jn.l.mê) Belavkirin. Perçekirin. (K) bn: Kirin. |
| **Pergî** | (n.x.mê) Kelpik. Tîvkil.: Pergîyê keskanê. Pergîyê berîyê. |
| **Pergîn** | (n.x.mê) Pêrgînî. |
| **Perik 1** | (n.dar.mê) 1. Perê kaxezê yê biçûk. 2. Perên biçûk yen balindeyan.3. Kartên lîztinê. 4. Perikên kaxezî yên tûtinê di xin nav û di pêçin jibo çêkirina cigaran. |
| **Perik 2** | (n.dar.mê) Baweşînk. |
| **Peristin** | (k.jn.x.mê) Perêstin. |

| | |
|---|---|
| **Peritandin** | (k.jn.x.mê) Mirov tiştekî pirt, perçe bi kit. Hincinandin. Pirtkirin. : Ji kerban kaxe û cilikên xwe peritandin. (K) bdn: ez di peritînim em di peritînîn, tu di peritînî hûn di peritînin, ew di peritîne[…it] ewan di peritînin. Pr: dê[bi] peritînim peritînîn, peritînî peritînin, peritîne[nit]. Bdb: di peritand, di peritandin. Db,dûr: peritandibû,peritandibûn. (F): bi peritîne, bi peritînin. |
| **Peritîn** | (k.jn.x.mê) Pirtikîn. Pirtpirtbûn. Mandîbûn. : Heta ez bi ser çîyayî keftim, cilikên min peritîn.(K) bdn : ez di peritim em di peritîn, tu di peritî hûn di peritin, ew di perite[...it] ewan di peritin. Pr: dê[bi] peritim, peritîn, peritî, peritin, peritit[te]. Bdb: ez di peritîm, em di peritîn.tu di peritî, hûn, ewan di peritîn. Ew di peritî. Db,dûr: ez peritîbûm,em peritîbûyn(bûn), tu peritîbûy, hûn, ewan peritîbûn, ew peritîbû. (F): bi perite, bi peritin. |
| **Perixandin** | (k.jn.x.mê) Gemirandin. Mesajkirin. Vemalîn. :Daykê pişta zarokê xwe di perixand. (K) bdn :ez di perixînim em di perixînîn,tu diperixînî hûn di perixînin, ew di perixîne[….it] ewan di perixînin. Pr :dê[bi] perixînim, perixînîn, perixînî, perixînin, perixîne[…it] . Bdb: di perixand, di perixandin. Db,dûr : parixandibû,perixandibûn .(F): bi perixîne, bi perixînin |
| **Perî 1** | (hk.cih,n.x.mê) Ciheke taybet yê perdekirî û xemlandî, bûkê li bin di danin :Perî ya bûkê. |
| **Perî 2** | ( n.x.mê) Jinên şox û ciwan wek firîşte. Zerî. |
| **Perîn** | (k.jn.x.mê) Karê guhnelîyê. Cotbûn. : Dema perînakewalane. (K) bdn :ez di perim em di perîn, tu di perî hûn di perin, ew di pere[....it] ewan di perin. Pr: dê[bi] perim, perîn, perî, perin, perit. Bdb: ez di perîm,em di perîn, tu, ew di perî, hûn,ewan di perîn. Db,dûr : ez perîbûm,em perîbûyn, tu perîbûy, hûn, ewan perîbûn, ew perîbû. (F): bi pere, bi perin. |
| **Perîşan** | (hn,hk.x.çewa) 1. Bê rê. Posîde. Westayî. Bêgêwil. Xemgîn. Hejar. 2. Navê pîrekane. |
| **Perîşanbûn** | (k.jn.l.mê) Hejarbûn. Bê cih û rê bûn. Pergendebûn. (K) bn : Bûn. |
| **Perîşanî** | (n.dar.mê) Derdeserî. Hejarî. Malwêranî. |
| **Perîşankirin** | (k.jn.l.mê) Derbiderkirin. Hejarkirin. Malwêrankirin. (K) bn: Kirin. |
| **Perîşk** | (n.x.mê) Petîlkên berfê. Kulîlkên befirê. |
| **Perîxan** | (n.l.mê) Navê jinane. |
| **Perîzade** | (n.l.mê) 1.Jina nazdar ya ji nivşê perîyan.2. Nexweşîyeke ji egera têkçûna karê derdanan, gerdena mirovî di êvite[werimit]. |
| **Perjan** | (n.dar.nêr) Tan. Kotan. Pîjan. |
| **Perjankirin** | (k.jn.l.mê) Tankirin. : Em dê rexûçanên baxê xwe perjan kin dako ji ziyanan bi hêt paraztin. |
| **Perjankirî** | (hk.l.çewa) Tankirî. : Tu kes ni kare biçe nav gorisatana gundê me çunkî ya perjankirî ye. |
| **Perjinîn** | (k.jn.dar.mê) Hildan û aderkirina darana ji çeq û tayên zêde jibo bi qelew û xemildar bi de. Veperjinîn. |
| **Perjîn** | (n.dar.nêr) Perjan. |
| **Perleman** | (hk.cih,.cîh.mê) Civata nûnerên hilbijartî ji alîyê gel ve. Parlamento. |
| **Permêw** | (n.l.mê) Belgê darmêwan. Belgên mêwan. |

| | |
|---|---|
| **Pero** | (n.x.nêr) Pateyê ji pembû, kitan, melez, hirî û htd di hêt çêkirin mirov cilik, perde,kule, çarçef û htd jê çê di kin. |
| **Perok** | (n.dar.nêr) Pero. |
| **Perozînk** | (n.dar.mê) Teşqele. Xapandin. Binîkolan. Tepik. |
| **Perperok** | (n.dar.mê) Pelatînk. |
| **Perpitandin** | (k.jn.x.mê) Gevizandin. Hilavêtin.Xo perpitandin,ango; xo hilavêtin.Veperpitandin. :Mirîşka serbirî xwe perpitand. : (K) : bdn: ez di perpitînim em di perpitînîn, tu di perpitînî hûn di prpitînin, ew di perpitîne[...it] ewan di perpitînin. Pr:dê +bdn. Bdb : di perpitand, di perpitandin. Db,dûr :perpitandibû, perpitandibûn. (F) : bi perpitîne, bi perpitînin. |
| **Perpitîn** | (k.jn.x.mê) Gevizîn. Lerzîn. Rahavêtin. (K) bdn : ez di perpitim em di perpitîn, tu di perpitî hûn di perpitin, ew di perpite[...it] ewan di perpitin. Pr :dê bi+ bdn. Bdb : ez di perpitîm, em, hûn, ewan di perpitîn, tu, ew di perpitî. Db,dûr : ez perpitîbûm, em perpitîbûyn, tu perpitîbûy, hûn perpitîbûn, ew perpitîbû, ewan perpitîbûn. (F) : bi perpite, bi perpitin. |
| **Perqijandin** | (k.jn.dar.mê) Pirtikandin. Hincinandin.(K) bdn : ez di perqijînim em di perqijînîn, tu di perqijînî hûn di perqijînin, ew di perqijîne[...it] ewan di perqijînin.Pr :dê bi+bdn. Bdb : di perqijand, di perqijandin. Db,dûr : perqijandibû, perqijandibûn. (F) : bi perqijîne, bi perqijînin. |
| **Perqijîn** | (k.jn.dar.mê) Pirtikîn.Bizdiyan. Herişîn. . (K) bdn : ez di perqijim em di perqijîn, tu di perqijî hûn di perqijin, ew di perqije[...it] ewan di perqijin. Pr :dê bi+bdn. Bdb : ez di perqijîm, em,hûn,ewan di perqijîn, tu, ew di perqijî. Db,dûr : ez perqijîbûm, em perqijîbûyn, tu perqijîbûy, hûn,ewan perqijîbûn, ew perqijîbû. (F) : bi perqije, bi perqijin |
| | |
| **Persîv** | (n.x.mê) derd Nexweşîyeke difinên mirovî di hên xwar û mirov di bêhnijit, hind caran ta jî di gel da di hêt. |
| **Pert** | (hk.x.çewa) Belav. Pirt. Bêserûber. |
| **Pertal** | (n.dar.pir) Kelûpel. Pergal. |
| **Pertav** | (n.l.mê) şabîta rojê, ronahîyê, layêtê û htd. |
| **Perû** | (n.x.mê) candar pêşk Stêrstêrok. |
| **Perûk** | (n.dar.nêr) Pateyên ji hirî,pembû, avirmîşî û htd hatîn çêkirin. Perok. |
| **Perwa** | (n.x.mê) Tirs. Sehim. Erjeng. |
| **Perwane** | (n.dar.nê) 1.Xudan per.2.Perên bi hêza agir, bayî yan her têhneka din di zivrin jibo paldana tenan yan hînk[fînik]kirinê bi kar di hêt. Pinpinîk. 3. Pelatînk. |
| **Perwaz** | (n.dar.mê) 1. Kevî. 2.Firîn. |
| **Perwer** | (hn,hk.x.çewa) Dilsoj. Evîndar. |
| **Perwerde** | (n.dar.mê) 1. fêrkirin. 2. dezgehên fêrkirinê. Sexbêrî. |
| **Perwerdekar** | (karn.dar.dz) Fêrvan. Çavdêr. Xwedîker.Sexbêrkar. |
| **Perwerdekirin** | (k.jnlmê) Fêrkirin. Sexbêrkirin. :Mamostayî qutabîyên xwe baş perwerde kirine.(K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Perwerî** | (n.dar.mê) Dilsojî. |
| **Perwîn** | (n.x.mê) Navê keçane. |
| **Perzîn** | (n.x.mê) Cantikê name û kaxezan. Poste. Name. |
| **Perzole** | (n.l.mê) xwarin Goştê birajtî yê perasîyan. |
| **Pesar** | (n.x.nêr) Çol. Aqar. Beten. Basik. |
| **Pesin** | (n.x.mê) Nîşandana kar û xebat û kesatîya mirovî. Navlêdan. Biha. Nirx. |
| **Pesinandin** | (k.jn.dar.mê) Nirxandin. Biha dan.(K) bdn: ez di pesinînim em di persinînîn, tu di pesinînî hûn di persinînin, ew di pesinîne[...it] ewan di pesinînin.Pr:dê bi+bdn. Bdb: di pesinand, di pesinandin. Db,dûr: pesinandibû, pesinandibûn. (F): bi pesinîne, bi pesinînin. |
| **Pesindan** | (k.jn.l.mê) Bilindkirin. Nirxandin. Pesinandin. : Ervo mamostayî gelek pesina qutabîyên xwe di da. (K) bn: Dan. |
| **Pesinkar** | (karn.dar.dz) Kesê xebara mirovan di nirxîne. |
| **Pesinkirin** | (k.jn.l.mê) Pesinandin. |
| **Pespende** | (hk.x.çewa) Bêdeshelat. Lewaz. Kêrnehatî. Bêbiha. |
| **Pespinde** | (hk.x.çewa) Pespende. : Pespindeyo; kengî tu we lê hatî li dîwanan bi axivî. |
| **Pest** | (n.x.mê) Giranî. Givaştin. |
| **Pestal** | (n.x.mê) Pêlav [cezme]ya serbazan. |
| **Pestan** | (n.x.mê) Pest. Givaştin. |
| **Pestandin** | (k.jn.x.mê) Givaştin. : Penîrî bi pestîne da av ji nav der bi keve.(K) bdn: ez di pestînim em di pestînîn, tu di pestînî hûndi pestînin, ew di pestîne[...it] ewan di pestînin. Pr: dê bi + bdn. Bdb: di pestand di pestandin.db,dûr: pestandibû,pestandibûn. (F): bi pestîne, bi pestînin, |
| **Peste** | (n.x.mê) Stranên sivik û bi lez. Lavje. |
| **Pestegotin** | (k.jn.l.mê) Gotina stiranêd peste. :Pestegotina wî ne wek yan devera meye. |
| **Pestek** | (n.x.nêr) Êlek. Çoxik.: Pestekê xwe li ber xwe kir çû govendê. |
| **Pestkirin** | (k.jn..lmê) Giranî êxistine ser.(K) bn : Kirin. |
| **Peşêman** | (hn,hk.dar.çewa)1. Mirov karekî di ke,ne wek dixwaze derkevit. Mirovê encamê karê xwe ne qayîl be.2. Navê mêrane. Poşman. Pend :Heger şax li peşêman hatibana da yên min gehin esmanî. |
| **Pêşêmanbûn** | (k.jn.l.mê) Paşgezbûn di karekî da . Dema mirov peşêman di be. (K) bn :Bûn. |
| **Peşêmanî** | (n.dar.mê) Xwezî nekirina karê mirovî kirî. Pêşêmanbûn. |
| **Pêşêmakirin** | (k.jn.l.mê) Mirov we li yekî bi ke ko ji kiryar û gotina xwe peşêman bi be. (K) bn :Kirin. |
| **Peşik** | (n.x.mê) Pirtên tenên peqî. Seçme. Çipik. Dilop. :Top peqî peşikêt wê di ser serê me ra derbaz bûn. |
| **Peşîn** | (k.jn.x.mê) Pirtek ji tiştekî ve bit û bi firit. Firîn. Vedan. Vepeşîn. |
| **Peşkîn** | (k.jn.x.mê) Bêgavbûn. Neçarbûn. |
| **Peşm** | (n.x.mê) Hirî.Rîs. |
| **Peşmergîz** | (n.l.pir) şelûşepik. |
| **Peşmîn** | (n.x.mê) Peşm. Hirî. |

| | |
|---|---|
| **Peştemal** | (n.l.mê) şal. şîtik. |
| **Peşyan** | (k.jn.x.mê) Peşîn. Vepeşyan. |
| **Peta** | (n.x.mê) Persîv. Pejî. |
| **Petî** | (hk.x.çewa) Zelal. Vavartî. :Zimanê kurdî yê petî. Ang; zimanekê vavartî ji peyvên biyanî. |
| **Petîkirin** | (k.jn.l.mê) Zelalkirin. Vavartin. (K) bn: Kirin. |
| **Petrol** | (n.cîh.mê) Neft. |
| **Petrome** | (n.x.mê) Pişka darek hişîn û ter di cihê bi mişarî yan kêrê kelaştî da çandî. |
| **Petromekirin** | (k.jn.l.mê) Pişk çandin di nav kelişteya darê da, ya hatî çêkirin bi rêya petomeyan , bi naylonî di pêçin ta çend rojan hişîn di be.(K) bn: Kirin. |
| **Petromekirî** | (hk.l.çewa) Hatî petromekirin. :Hirmîka petromekirî. |
| **Pev** | (pêrb) rêzman Alavê girêdanê. Bi hev. Bi hev ra. Pêkve. |
| **Pevçûn** | (k.jn.dar.mê) Du yan pêtir bir, deste, mirov yan giyndar dijî hev dujwarîyê bi kar bi hînin,bi cengin ji pêxemet meremekê. Pevdaçûn. Cengîn. Li hev û du dan. (K) bn: Çûn. |
| **Pevdeng** | (hk.dar.çewa) Hevdeng. Hevbîr. |
| **Pevhatin** | (k.jn.dar.mê) Li hev hatin .Pêkhatin. Brx Pevçûn. (K) bn: Hatin. |
| **Pexşan** | (n.x.mê) 1.Deqeke bi gotinên xweş û selîqe hatîye darijtin.2. Navê jinane. |
| **Pey** | (pêrb) rêzman Li pey. Li dîv.: Birayê min çû û me da pey wî. |
| **Peya 1** | (n.x.nêr) Zelam. Mêr. |
| **Peya 2** | (hn.x.çewa) Yê bi pêyan di çit. Bi rê di çe. Ne siyar [siwar]. Pend :Siyarê xelkî herê peya ye.ang ; di vêt çavê mirov ne li destê biyanî be. |
| **Peyabûn** | (k.jn.l.mê) Weke mirov ji ser pişta dewaran yan tirombêlan da di keve. Di hête xwar. Dakevtin. (K) bn : Bûn. |
| **Peyade** | (n.dar.dz) Mirovên bi pêya di çin yan di hên. Ne siyar. |
| **Peyakirin** | (k.jn.l.mê) Ji tirombêl yan dewaran anîn xwar. :Bûk ji ser pişta mahînê peya kirin. (K) bn : Kirin. |
| **Peyale** | (n.x.mê) Perdaxeka biçûk. Piyale. |
| **Peyam** | (n.x.mê) Nûçe. Dengûbas. Birîske. |
| **Peyamber** | (pîşn.l.dz) 1. Hilgirê nameya pîroz[pêxember].2. Nûçevan. Nûçegihan. |
| **Peyamnêr** | (pîşn.l.dz) Yê peyaman di şîne. Peyamber. Nûçegihan. Nûçevan. |
| **Peyamnêrî** | (karn.l.mê) Karê nûçevanan. |
| **Peyarê** | (n.l.mê) 1.Rêya taybet jibo peyadeyan. 2.Rexên cadeyan, bi tinê mirov bi pêyan lê di hên û di çin. |
| **Peyda** | (hk.x.çewa) Xuya. Berçav. |
| **Peydabûn** | (k.jn.l.mê) Xuyabûn. bi Destkevtin. : Ez li te di geram û tu li tu cihan peyda nabî ?. |
| **Peydakirin** | (k.jn.l.mê) bi Dest xwe êxistin. : Tu di karî bo min kitêbekê peyda bi kî?. (K) bn : Kirin. |
| **Peydok** | (n.dar.mê) 1.Sêdare. 2. Darikê hilawîtina cilan. |
| **Peyîsk** | (n.x.mê) Pêstirk. Pêpelîsk.Pêpelok. |
| **Peyje** | (n.x.mê) Peyîsk. |

| | |
|---|---|
| **Peyker** | (n.x.nêr) Mînakê mirov yan candaran bi ber, gêc, çîmento û htd hatî avakirin. Pot. |
| **Peykersaz** | (pîşn.dar.dz) Kesê pispor di warê çêkirina peykeran da. Peykervan. |
| **Peykersazî** | (karn.l.mê) Karê peykersazan. :Karê birayê min peykersazîye. |
| **Peykertiraş** | (pîşn.l.dn) Peykervan. |
| **Peykertiraşî** | (karn.l.mê) Peykervanî. |
| **Peykervan** | (pîşn.dar.dz) Kesê peykeran çê dike. |
| **Peykervanî** | (karn.dar.mê) Karê peykervanan. |
| **Peyman** | (n.x.mê) 1. Sûz. Rêkevtin. Qulp. 2. Navê jinane. |
| **Peymanbestin** | (k.jn.l.mê) Peymangirêdan. |
| **Peymandan** | (k.jn.l.mê) Sûzdan. :Em peymanê di din ko liser xebata xwe jibo azadîya Kurdistanê berdewam bin.:Peymandana me ji dile. |
| **Peymangirêdan** | (k.jn.l.mê) Sozdan. Rêkkeftin.mûrkirina peymanekê.(K) bn : girêdan. |
| **Peymangirtin** | (k.jn.l.mê) Peymangirêdan. |
| **Peyrew** | (n.x.mê) Bername.Rêbaz. Nî_an. |
| **Perewkirin** | (k.jn.l.mê) Pekevtin. Peyçûn. Pêgirtin. |
| **Peyt** | (hn,hk.x.çewa) bi Serûber. Rêkûpêk.Qayîm. Zîx. Çixt. Gurc. |
| **Peytbûn** | (k.jn.l.mê) Qayîmbûn. (K) bn : bûn. |
| **Peytî** | (n.dar.mê) Zîrekî. Ziftî. |
| **Peytkirin** | (k.jn.l.mê) Serûberkirin. Rêkûpêkkirin. Qayîmkirin. (K) bn : Kirin. |
| **Peyv** | (n.x.mê) 1.Gotin. Wuşe. Bêje. :Ciwantirîn peyv peyva KURDISTAN e. :Serokî peyveka nirxdar pêşkêş kir. 2. Navek kurdî du nivhsî ye. |
| **Peyvdar** | (pîşn.dar.dz) Axivtinkerê fermî yê dezgehek yan partekê. |
| **Peyvîn** | (k.jn.x.mê) 1.Axivtin. Gotin. : Seydayê me di heman dem da di nivîse û di peyve. 2. Navek kurdî du zayende.(K) bdn: ez di peyvim em di peyvîn, tu di peyvî hûn di peyvin, ew di peyve[....it] ewan di peyvin. Pr : dê [bi] peyvim, peyvîn, peyvî, peyvin,peyvit[peyve], peyvin. Bdb : ez di peyvîm, em,ew, hûn di peyvîn, tu,ew di peyvî. Db,dûr : ez peyvîbûm,em peyvîbûyn, tu peyvîbûy,hûn,ewan peyvîbûn, ew peyvîbû. ( F) : bi peyve, bipeyvin. |
| **Peywend** | (n.dar.dz) Navek di zayende. |
| **Peywendî** | (n.dar.mê) Têkilî. Gehandin. :Peywendîya têlefonî, internet tv û htd. |
| **Peywendîkirin** | (k.jn.l.mê) Tekelîkirin. Pêra axivtin. Danûsitandin.(K) bn : Kirin. |
| **Pez** | (n.x.dz) candar 1.Bireka mîhan. Kerekê mîhan. 2.Mîh. |
| **Pezare** | (n.x.mê) Derd. Jan. Pejare. Kovan. |
| **Pezîzank** | (n.dar.mê) tiraş Pezpezok. |
| **Pezkkuj** | (n.l.mê) tewal Tîtîk. |
| **Pezkûvî** | (n.l.nêr) Pezê kûvî. |
| **Pezpezok** | (nl.mê) Tov yan baqilên kêratan. |
| **Pezûdan** | (hk.dem) Spêde zû. Berbang. Elind. :Di gel pezûdanê em ji xwe rabûn. |
| **Pezvan** | (karn.dar.dz) Xwedîyê pez. Aivanê pezî. |
| **Pezvanî** | (karn.dar.mê) Karê xwedî yan sexbêrkirina pezî. |
| **Pê 1** | (n.x.nêr) can Yêk ji du,çar yan pitir hedamên leşî, parçeya binî ji lingî ko tibil û du gozek li serin, di mirov û giyandar pê bi rêve di çit. Ling. |

| | |
|---|---|
| **Pê 2** | (pêrb) rêzman Alavê girêdana hevekan,ango :bi wî, bi wê, bi wan û htd. : Xwarin pê kevikî xwar. |
| **Pê-alinkanê** | (nl.mê) yarî Lîztikek zarokane xwe lêk di din pêyên xwe têk di alînin ka kî dê kê li erdî bi de. |
| **Pêbaz** | (n.dar.mê) Pira derbazbûna peyadeyan. |
| **Pêç 1** | (hk.x.çewa) Xarûvîç. Rêyê xar, bi çepûçîr.Tiştê werbadayî. |
| **Pêç 2** | (n.x.mê) Pêçe. |
| **Pêçan** | (k.jn.x.mê) Tiştekî lêk di werbadin, pêç di ke :Bapîrê min cigare pêça, dersûk pêça.(K) bdn : ez di pêçim em di pêçîn, tu di pêçî hûn di pêçin, ew di pêçe[...it] ewan di pêçin Pr: dê[bi] pêçim, pêçîn, pêçî, pêçin, pêçit[pêçe]. Bdb: di pêça, di pêçan. Db,dûr : pêçabû,pêçabûn. (F): bi pêçe bi pêçin. |
| **Pêçe** | (n.x.mê) Perokê jin serûçavên xwe pê di pêçin. |
| **Pêçik 1** | (n.dar.mê) 1.Pateyeke, zarokên sava pê di pêçin. Qumatk.2. Tûrik. |
| **Pêçik 2** | (n.x.mê) Tilîyên pêyan. Paçik. |
| **Pêçî** | (n.x.mê) Tilîyên pêyan. |
| **Pêçoke** | (n.dar.mê) endaze Aêweyên pêç. |
| **Pêçûlk** | (n.dar.mê) Du darin cihê pêyên mirovî li ser hene çendekê ji erdî bilindtirin, jiber herî û befirê mirov pêyên xwe li ser çuklên wan di danin û birêve di çin. |
| **Pêçûn** | (k.jn.dar.mê) Li dû çûn. Peykevtin. Vekolîn. |
| **Pêda** | (hk,cih) Li ser da hatin . Dane ber xwe. Jûrda. |
| **Pêdadan** | (k.jn.l.mê) Lêdan. Qutan. :Kurê xo girt û pê da da.(K) bn: Dan. |
| **Pêdakirin** | (k.jn.l.mê) Pêwerkirin. Bi serda kirin. Rêjtin ser. : Av bi agirî da kir. |
| **Pêdanîn** | (k.jn.dar.mê) Dan nasîn. Misogerkirin. |
| **Pêdark** | (n.l.mê) Pêlava darî. Qepqepk. |
| **Pêdirêj** | (hk.l.çewa) Mirov yan giyandarê lingdirêj. |
| **Pêdvî** | (n.l.mê)1.Tiştê mirovî pêwîstî pê hebe. :Pêdvîyên navmalê. Pertal. Pêwîst.2. Gereke. Divêt. |
| **Pêdizkî** | (hk.l.çewa) Dema mirov ji tirsan bi dizîve û hişyarî bi rê di çit da deng ji pêyên mirovî ne hêt. |
| **Pêdizkîçûn** | (k.jn.gl.mê) Hêdî bi dizîve çûn dako kes pê nizanit. : Çima tu weha bi pêdizkî di çî?. (K) bn:Çûn. |
| **Pêdizkîve** | (hk.l.çewa) Kiryara hêdî û bi dizî ve ku kes jê haydar nebe. Pêdizkî. |
| **Pêdizkîveçûn** | (k.jn.gl.mê) bn :Pêdizkîçûn. :Ez bi pêdizkî ve çûm ser cihê xwe dako kesê ji xew ra ne kem. |
| **Pêgeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê mirov bi şêt lê bi mînit, pê xwe li ser danit. Wargeh. |
| **Pêhin** | (n.x.mê) Lêdana gurzekî bi pêyî.; lîstikvanî pêhinek li tepê da. Pên. |
| **Pêgir 1** | (hk.l.çewa) Mirovê pêyên wî di mezin. Pêmezin. |
| **Pêgir 2** | (hn,hn.dar.çewa) Mirovê biryar û sûzan bi cî di hînit. |
| **Pêgirî** | (n.dar.mê) Milkeçî. :Pêgirîya xwe hember biryarê da zanîn. |
| **Pêgirîkirin** | (k.jn.l.mê) Bi cih anîna erk û biryaran. : Divê em her dem pêgirîyê bi qanûnê bi kin.(K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Pêgotin** | (k.jn.dar.mê) Dema mirov stiran yan çîrokan lisernavdarekî yan bûyerekê di bêje û pesina wî,wê di de. : Dengbêjan pir stran bi qehremanîya pêşmergehan gotine. (biwan,wê,wî gotin). |
| **Pêgotî** | (hk.l.çewa) Mirov xelik gelek liser di axivin. Mirovê bernas.Pend :Sor di sotîne, sipî di pêtîne(sar), reş di pêgotî ne. |
| **Pêhêl** | (n.dar.mê) Giroveya destûrdana karirin, derbazbûn, çûnejor û htd. Bihêl. : Pêhêla hajotina tirombê. |
| **Pêhêlan** | (k.jn.dar.mê) Destûrdan. Lê xweşbûn. Azakirin. (K) bn: Hêlan. |
| **Pêjandin** | (k.jn.x.mê) Nan çêkirin, nan yan sawik qelandin.Patin.: Kabanî nanî di pêjit. |
| **Pêjin** | (n.x.mê) Dengê pêyên mirovan yan ginawiran di hêt, bê ko mirov tişekî bi bînit.:Pêjna mirovekî ya di hêt neke diz bit!. |
| **Pêjtin** | (k.jn.x.mê) Nan patin. Nan qelandin.pêjandin. Pend :Di pêjit, lê na pêjit.ang ; gotina bê kiryar. (K) bdb: ez di pêjim em dipêjîn, tu di pêjî hûn di pêjin, ew di pêje[....it] ewan di pêjin. Pr : dê[bi] pêjim, pêjîn, pêjî, pêjin, pêjit[êje], pêjin. Bdb : di pat[pêjt] di patin[pêjtin]. Db,dûr : pêtibû, (pêjtibû).... bûn..(F) : bi pêje , bipêjin. |
| **Pêk** | (pêrb) rêzman Bi êk. Bi hev. |
| **Pêkanîn** | (k.jn.l.mê) Rêkxistin. Pêk înan. li hev aîn. Diristkirin. (K)bn : Anan. |
| **Pêkdan** | (k.jn.dar.mê) Wêrankirin. Kavilkirin. Xirakirin. : Dujminan gundê me têk û pêk da. |
| **Pêkdadan** | (k.jn.dar.mê) 1. Li hev xistin. Êk û du qutan. Pevçûn. 2. Pêçan. Werpêçan. Girtin. Têkwerkirin. : Nivînêd xwe pêk da dan û çû. (K) bn :Dan, dadan. |
| **Pêkenîn** | (k.jn.dar.mê) 1. Gotinên bi kenî. : Mamê min pêkenînek got gelek ya bi kenî bû. .2. Mirov bi tiştekî yan bûyerek seyr bikenit.(K): ez[pê] di kenim em di kenîn, tu di kenî hûn di kenin, ew di kenit ewan di kenin.(F) : [pê] bi kene bi kenin. Pr : dê{pê} [bi] kenim, kenîn, kenî, kenin, kenit[kene] kenin. Db: [pê] kenî, kenîn. |
| **Pêkenok** | (hk.dar.çewa) Mirovê bi kenî. Lêbok. |
| **Pêkevtin** | (k.jn.dar.mê) Li dû kevtin. Kevtin pey.Peykevtin. |
| **Pêkhatin** | (k.jn.l.mê) Lihevhatin. Aştbûn. Gehiştin biryarekê. (K) bn: Hatin. |
| **Pêkgihorîn** | (k.jn.l.mê) Dema mirov tiştekî bi det yekî û hember tiştekê dî ji wî wergirit.cih, erd, xanî û htd pêk bi gihorin. : Azad û Aştî tirombêlên xwe pêkgihorîn.(K) bn: Gihorîn. |
| **Pêkirin** | (k.jn.dar.mê) Hilkirin. Berdanê. : Agir, lempe, sope pê kir. |
| **Pêkkirin** | (k.jn.l.mê) mirovên ko di karin bi hevra bijîn.li hevkirin. Guhdarî ya êk bi ken (K) bn: Kirin. |
| **Pêkol** | (n.l.mê) Bizav.Xebat.Xaztin. Viyan. |
| **Pêkolkirin** | (k.jnlmê) Xwaztin. : Min gelek pêkol kir ko te bi bînin.(K) bn: Kirin. |
| **Pêkotir** | (n.l.mê) giya Pêmirîşk. |
| **Pêkve** | (hk.dar.çewa) Bi êkve . Di gel êk. Bi hevre. Tebayî. : Em dê pêkve herin seyranê. |

| | |
|---|---|
| **Pêkveman** | (k.jn.l.mê) Bi êkve man. Mane bi êkve. Bi êkve nûsan. :Ev du kefçike hind di nîsekin yên mayne pêkve. :Eve hewe çiye hûn mayne bi stoyê êk ve ?. ang ; cirebirkirin. (K) bn: Man. |
| **Pêkvenûsan** | (k.jn.l.mê) Pêkveman. (K) bn : Nûsan. |
| **Pêkxistin** | (k.jn.l.mê) Lêkdan. Li hev xistin. |
| **Pêl** | (n.x.mê) 1.Vedana avê. Hatina hilmeka bayî. Aepol. Delav.2. Navê keçane. |
| **Pêlav** | (n.l.mê) Tişte mirov li pêyên xwe di ke. Aekal. |
| **Pêldan** | (k.jn.l.mê) Diristbûna pêlan. Av vedan.Pêlvedan. |
| **Pêlkvan** | (n.dar.nêr) Navê xortane. |
| **Pêlvedan** | (k.jn.l.mê) Pêldan. |
| **Pêlweş** | (n.dar.mê) Radyo. Îzgeh. |
| **Pêlweşandin** | (k.jn.l.mê) Weşan bi radyoyan. Belavbûna pêlan. Belavkirin. |
| **Pêmirîşk** | (n.l.mê) 1. Pêyên mirîşkan. 2. Giyayeke li çiya û dolên Kurdistanê pire, bi xavî û zerkirî di hêt xwarin, şbelgên wî mîna pêyên mirîşkane. 3. Bizaveke mirîşk bi lingan di ke jibo peydakirina tomikê xwe. |
| | |
| **Pêmirîşkkirin** | (k.jn.ggl.mê) Balinde, nemaze mirîşk pencêd pêyên xwe li erdî di xit û di vekolit jibo peydakirina xwarinê li bin erd û gelgeleyî. :Kew pêmirîşkê di ke dako ji xwe ra danî ji nav pelexî derîne û bi xwe. |
| **Pêmîz** | (n.dar.mê) Mîztina seyan. |
| **Pêmîzkirin** | (k.jn.l.mê) Seg li dema mîztinê pêyekê xwe bilind dikit. |
| **Pên** | (n.x.mê) bn: Pêhin. |
| **Pênase** | (n.l.mê) Çewayîya nasîna zaravan. Nasîn. |
| **Pênc** | (hijn.çend) Hijmara 5. 4+1= 5. 10-5=5. |
| **Pêncem** | (hijn.destni) Ya,yê,yên Pêncê. |
| **Pêncemîn** | (hijn.dest) Pêncem. |
| **Pênchizar** | (hijn.çend) Hijmara 5000. |
| **Pêncî** | (hij.çend) Hijmara 50. 40+10 = 50. 60-10 = 50. |
| **Pêncmilyon** | (hijn.çend) Hijmara 5000000. |
| **Pênçokanê** | (n.dar.mê) yarî Yarîyeke, zarok yan sinêle, bi pênç beran di lîzin. |
| **Pêncsed** | (hijn.çend) Hijmara 500. |
| **Pêncşemb** | (n.l.mê) Rojeke ji heftîyê, roja berî înê û piştî çarşembê.Heger ji êkşembê dest pê bi ken, dê bite roja pêncê ji heftîyê. |
| **Pêndav** | (n.dar.mê) Corekê şemayê ye mêşhingiv derê kuna xwe pê di girin û teng di ken jibo parastin ji gerim,sirê û adîyên dujmin. |
| **Pêndeva** | (n.dar.mê) Pêndav. |
| **Pêndixe** | (n.dar.mê) Pênc rojên kanîna biçûk ji roja 25 î meha 12 a zayînî tanî 30 heman mehê. Aarezyên seqayî di kevin da bawer di kirin ko ev pênc rojên han bêyî befir barîn derbaz babin.; Pend:Pêndixe derbaz nabin bê tilxe. ang; tilxeya befirê. |
| **Pêngav** | (n.l.mê) .1. Dirêjîya di hêt pîvan navbera havêtina du gavên mirovî. Gav. 2. Pêşkevtin. |
| **Pêngavhavêtin** | (k.jn.l.mê) Pêşveçûn. (K) bn: Havêtin. |

| | |
|---|---|
| **Pêngiwîn** | (n.cîh.mê) candar Giyandarekê balindeye, na firit, hêkkere, hişkavîye, li gopikên tepa erdî bi awayê bir(revde) di jîn. |
| **Pênijîn** | (k.jn.x.mê) Hizirîn. Hizirkirin. Nijinîn. |
| **Pênivîs** | (n.l.mê) Qelem. Xame. |
| **Pêpan** | (hk.çewa) Mirovê pêpan. Pêmezin. |
| **Pêpeling** | (n.l.mê) Pêpelîsk. |
| **Pêpelîsk** | (n.l.mê) Peyîska ji daran hatî diristkirin, pêpikên wê jî her ji darî ne. Pêstirk. Peyîsk. |
| **Pêpelok** | (n.dar.mê) Pêpelîsk. |
| **Pêpetî** | (hk.dar.çewa) Pêxas. |
| **Pêpik** | ( n.dar.mê) 1. Pêyên kewalê ser birî.2. Darên peyîskê yên mirov pêyên xwe li ser da dinit jibo bi serkevtinê. :Peyîska banî ji 30 pêpikan pêk di hêt. |
| **Pêr** | (hk.dem) Du rojên borîn. : Ji pêr were[hir ve] min hevalê xwe ne dîtîye. |
| **Pêra** | (pêrb.alv.gir) rêzman Di gel . Bi wî,wê,wan re. |
| **Pêrar** | (hk,dem) Du salên borîn.Berîya du salan. :Pêrar ez çûbûm derveya welatî. |
| **Pêrbest** | (n.dar.mê) rêzman Alavên girêdanê di zimanî de ; mîna : û, weha, jiber. Ji, li, lewra, çunkî, tanî, çi, çiqas û htd. Gîhanek. |
| **Pêrgîn** | (n.dar.mê) Pêrgînî. |
| **Pêrgînî** | (n.dar.mê) Pêşwazî. Bi xêrhatin. |
| **Pêrgînîkirin** | (k.jn.l.mê) Pêşwazîkirin. Xêrhatinkirin. . .:Ahingvanên hêja em ji dil û can pêrgînîyê li hewe di ken. :Bi navê bûk zava babê zavayî pêrgînî li dewatîyan kir.(K) bn : Kirin. |
| **Pêrpîne** | (n.x.mê) giya Gîyekê hilîye, li ber çoyan hişîn di be, jibo xwarinê di xin nav mast û avikan.Pend :Bila pêrpîne liserdilê wî hişîn bi be. ang; mirovê ne hêt rayê, mirovê rikdar. |
| **Pêrû** | (n.x.mê) Navê stêrane. |
| **Pêsîr** | (hk.cih,n.x.mê) Cihê di kevit nav yan nêzî ranan li alê singî. Dang. Dehmen. Zincîra şelwalî. Beten. Danga çiya û girikan. |
| **Pêstirk** | (n.dar.mê)1. Pêpelîsk. Peyîsk.2. Giranbûna leşî. Qerisîna leşî. |
| **Pêstirkgirtin** | (k.jn.l.mê) Leşê mirov ji tirsan di raweste û mirov neşêt bi livit. :Reşek bo wî çê bû, pêstikê girt ne şîya bi revit. (K) bn : Girtin. |
| **Pêş** | (hk.dem) Berayî. Li berahîkê.li ber.pêş çavan, li ber çavan. BrxPaş. |
| **Pêşandar** | (karn.dar.dz) Rêber. |
| **Pêşangeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Pîşangeh. |
| **Pêşayî** | (n.dar.dz) Berahî. Serkêşî. Serokatî. :Li pêşayîyê em pêrgînîya mêvanêd hêja di keyn. |
| **Pêşbazî** | (n.dar.mê) yarî Berîkanê. |
| **Pêşbend** | (n.dar.mê) rêzman Pêşgir. |
| **Pêşber** | (n.dar.dz) 1. Misoger.2.Ber bi pêş, Serwer. |
| **Pêşberî** | (n.dar.mê) Misogerî. |
| **Pêşberîkirin** | (k.jn.l.mê) Hevberî êk kirin. Anîn hember hev. Hevberkirin. |
| **Pêşbirkê** | (n.dar.mê) yarî Berîkanê. |
| **Pêşbîn** | (hn.l.çewa) Mirovê zana yê paşerojê di xwînit. |

| | |
|---|---|
| **Pêşbînî** | (n.l.mê) Hizirkirina bûyerêd di hên .Dûrbînî. |
| **Pêşbînîkirin** | (k.jn.gl.mê) Hizir zanîna paşerojê û xwe jibo berhev kirin. : Ez pêşbînîya rojeka geş jibo gelê kurd di kim. (K) bn : Kirin. |
| **Pêşçav** | (hk.l.çewa) Tiştê mirov bi çavan di bînit. Diyar. Xuya. Aşkera. |
| **Pêşçavkirin** | (k.jn.gl.mê) Xuyakirin. Rûnkirin. Zelalkirin. Li ber çavan danîn. (K) bn : Kirin. |
| **Pêşda** | (hk,dem) Berayî. Dema li pêş. |
| **Pêşdar** | (pîşn.dar.dz) Serok. Rêber. Serdar. |
| **Pêşdarî** | (karn.dar.mê) Serokatî. Rêberî. |
| **Pêşdarîkirin** | (k.jn.gl.mê) Serkêşîkirin. Serokatîkirin. Rêvebirin.(K) bn : Kirin. |
| **Pêşde** | (hk.dem) Pêşda. |
| **Pêşdeçûn** | (k.jn.gl.mê) Serkevtin. Pêşkevtin. (K) bn : Çûn. |
| **Pêşdem** | (hk,dem.mê) Demek zû. Kar bi hêt encamdan berî jivanî. Pêşwext. |
| **Pêşdest** | (hk.l.çewa) Berhev. Di destî da. |
| **Pêşdestî** | (n.l.mê) Berî hemûyan. Li berahîyê. Yekemcar |
| **Pêşdestîkirin** | (k.jn.gl.mê) Li pêşîya her kesî dest pê kirin.:Cantikê xwe pêşdest bi ke, da jibîr ne key. |
| **Pêşeng** | (n.dar.dz) Berayî. Serkêş. Serwer. Semyan. |
| **Pêşeroj** | (hk,dem. Mê) Rojên li pêş mene. |
| **Pêşevan** | (karn.dar.dz) Serok. Berhîk.Rêber. |
| **Pêşewa** | (karn.dar.dz) Serok. Semyan. Pêşî. |
| **Pêşêxistin** | (k.jn.l.mê) Pêşxistin. |
| **Pêşgir** | (hk,cih.mê) rêzman Tiştê li cihekî berayîyê digirit. Pirteka pêşî ya peyvê di gire. Pêşbend. |
| **Pêşgotin** | (jn.l.mê) Gotina li berahîyê di hêt kirin yan nivêsîn. Brx Paşgotin |
| **Pêşhatî** | (n.dar.mê) Bûyer û rûdanên paşerojê. |
| **Pêşin** | (hk.dem) Pêş. |
| **Pêşî 1** | (n.dar.dz) Serkêş, Semyan. |
| **Pêşî 2** | (n.x.mê) candar Mêşikeka kirmijoke li ser xwîna giyanewer û mirovan di jît. |
| **Pêşîn** | (hk.dem) Pêş Cara pêşîn. Ang; cara yekê. |
| **Pêşînan** | (n.dar.dz) Kevineşop. Mezin. Babkal. :Pendên pêşînan. |
| **Pêşîne** | (n.dar.mê) Parê ne çêk. Parê kaş, berhev. Pare. |
| **Pêşîv** | (hk,dem.mê) Paşeroj. Rojên li pêş. |
| **Pêşkar** | (pîşn.dar.dz) Kesê li ber dezgeh, karxane, firoşgeh an karê nêrvanîyê di ke. Zêrevan. |
| **Pêşkarî** | (karn.dar.mê) Karê zêrevanîyê. |
| **Pêşkepî** | (hk.l.çewa) Kesê hevrikê mirovî di kar û hilbijartinan da. |
| **Pêşkevtin** | (k.jn.l.mê) Çûne pêş. Serkevtin. (K) bn: Kevtin. |
| **Pêşkevtî** | (hn.l.çewa) Hevçerx. Pêşveçûyî. Pilebilind. Serkevtî. |
| **Pêşkêş** | (hk.dar.çewa, n.dar.mê)1. Rêkûpêk. Peyt.2. Diyarî. |
| **Pêşkêşkirin** | (k.jn.l.mê) 1.bi Diyarî dan. :Mamê keça xwe pêşkêşî birazayê xwe kir. 2. Dane nasîn. (K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Pêşmal** | (n.dar.mê) Bermalk. Berkoşk. |
| **Pêşmerge** | (pîşn.dar.dz) Çekdarên berevanî yê ji ax û neteweya kurdistanê di ken. Xwegorîker. |
| **Pêşmergatî** | (karn.dar.mê) Karê pêşmergeyan. |
| **Pêşnîyar** | (n.dar.mê) Dema mirov boçûn û hizir ên serkevtî pêşkêşî alîyek havildar di ke jibo baştirkirina karî. Pêşnîyaz. |
| **Pêşniyardan** | (k.jn.gl.mê) Pêşkêşkirina pêşniyaran .Dana hizirnên pêşkevtî. (K) bn : Dan. |
| **Pêşniyarkirin** | (k.jn.gl.mê) Pêşniyardan (K) bn: Kirin. |
| **Pêşniyaz** | (n.dar.mê) Pêşniyar. |
| **Pêşrew** | (kanr.dar.dz) Serok. Pêşber.Serkêş |
| **Pêşû** | (n.x.mê) candar Pêşî. |
| **Pêşpirt** | (hk,cih.mê) rêzman bn: Pêşgir. |
| **Pêşve 1** | (hk.dem) Ber bi pêş . Jibo pêş. Alîyê singî. |
| **Pêşve 2** | (hk.dar.çewa) Li şûna. Li cihê. :Ew pêş babê xwe ve çû zibarê. |
| **Pêşvebirin** | (k.jn.l.mê) Ber bi pêş paldan, birin. Serêxistin. :Pêşvebirina karî, astê jiynê, astê zanînê.(K) bn: Birin. |
| **Pêşveçûn** | (k.jn.l.mê) 1.Pêşkevtin. ; Pêşmerge pêşveçûn ji çeperekî bo yê dî. 2. Çûn. pêşîyê.Çûn berhîyê. Pêşwazî lê kirin. :Berî bi gehin, gundî pêş mêvanan ve çûn. (K) bn: Çûn. |
| **Pêşveçûyî** | (hk.çewa) Pêşkevtî. |
| **Pêşverû** | (hk.dar.çewa) Mirovê hevçerix. Pêşkevtî. |
| **Pêşverûyî** | (n.dar.mê) Pêşkevtin. |
| **Pêşwazî** | (n.dar.mê) Pêrgînî. |
| **Pêşwazîkirin** | (k.jn.l.mê) Pêrgînîkirin. :Pêşwazî li mêvanan kirin. Babê zavay pêşwazîyeka gerim li xandîyan kir. (K) bn: Kirin. |
| **Pêşwext** | (hk.dem) Pêşdem. Zû. :Pêşwext em li jivana xwe amade bi bûyn. |
| **Pêşxistin** | (k.jn.l.mê) Pêşvebirin. Bilindkirin. Astê çandî li Kurdistan hatîye pêşxistin. (K) bn: Xistin. |
| **Pêt 1** | (hk.x.çewa) Rengzer. Rengmirî. ::Ev zaroye herê pête neko yê nisax bit?. |
| **Pêt 2** | (n.x.mê) Hilim û gurî ya agirî. :Pêta agirî bilind bû ber esmanan. |
| **Pêt 3** | (hk.x.çewa) Peyt. :Jineka pêt. Xortekê pêt. |
| **Pêtazî** | (hk.l.çewa) 1. Pêxas. 2. Xazok. :Pêtzî ji mal derkeft. |
| **Pêtbûn** | (k.jn.l.mê) Ji tirs, fehêtî yan mandîbûnê rengê rûçikê mirovî zer û xav di be. : Zarokê hejar ji tirsa babê xwe pêt bi bû. (K) bn : Bûn. |
| **Pêtik** | (n.dar.mê) Zilikê şixatê. Bizotk. |
| **Pêtivî** | (n.dar.mê) bn: Pêdivî. |
| **Pêtî** | (hk.dar.çewa) Renggorî.. Bêreng. Xav. Xirş. :Dara pêtî. |
| **Pêtîbûn** | (k.jnlmê) Pişbûn. Dar pêtî bû.ang; xavbû. :Nanê sêlê ji kevinî da yê pêtî bûy. (K) bn: Bûn. |
| **Pêtîkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov tiştekî pêtî bi ke.Pêtîbûn. |
| **Pêtkirin** | (k.jn.l.mê) Peytkirin. |
| **Pêvajo** | (n.dar.mê) Bername. Prose.Heyam.Qonax. |

| | |
|---|---|
| **Pêve** | (pêrb) rêzman 1. Nûsan tiştî bi êkve. 2. Pêve (hk,dem) Paşve.:Ji niho pêve ez dê dest bi rahênanên werzişî bi kim . Ji niho paşve. Ji vêrê û wêve. |
| **Pêveçûn 1** | (k.jn.l.mê) Heger mirovî karek şaş kir, divê pêve bi çit jibo dubare nebit.Peşêmanbûn. (K) bn: Çûn. |
| **Pêveçûn 2** | (k.jn.l.mê) Wek hev. Li hev çûn. : Ev keçe bi dayka xweve çûye. |
| **Pêvedan** | (k.jn.dar.mê) 1. Gestin. Leqdan. :Marî, dwîpişkî bi wî veda. 2. Lêdan. :Nan, sewik bi tenûrê vedan .ang;nan qelandin. (K) bn: Dan. |
| **Pêveder** | (hk.dar.çewa) Mirovê derd û belayê bi xwe ra di hînit. Mirovê kur.Mirovê beş Kêvroşka beş |
| **Pêvekirin** | (k.jn.l.mê) 1.Dema mirov tiştekî di êxit tiştek din. : Hevsîya me cilik bi ristê ve kirin. 2. Têxistin. :Di şermê êxistin. Ketine kirasê şermê. :Hewe ez pêve kirim, heger da çewa wesa bêjim. (K) bn: Kirin. |
| **Pêveman** | (k.jn.l.mê) 1. Pêkaveman . Pêkvenwîsan. :Rengê maye bi dîwarî ve û jê naçit. 2. daxwazkirin. Hîvîkirin. :Ez gelek mam pêve ko qayîl bi bit wî karî ne ket. :Ez gelek pêve mam da wî qayîl bikem, dest ji cigarekêşanê berde. :Cilk bi leşî ve man .:Cilk bi leşî ve man. (K) bn: Man. |
| **Pêvenan** | (k.jn.l.mê). Dema tiştekê bi yê dî ve di çespînî, bi nûsînî. bêxî ser yan bi gehînî hev :Stirk bi kaxezê ve na.:Destê bi devê wî ve na.:(K) bn: man. |
| **Pêvenûsan** | (k.jn.l.mê) Pêveman. :Benîşt bi cilikan ve nûsa. (K) bn: Nûsan. |
| **Pêvenûsandin** | (k.jn.dar.mê) Bi wî,wê, wan ve girêdan. Pêve çespkirin. Pêvekirin. |
| **Pêwîst** | (rd.dar.çewa) Pêdvî. :Karekê pêwîst. |
| **Pêwîstî** | (n.dar.mê) Pêdvî. Gerek. Divê.:Pêwîstîya min bi te heye. |
| **Pêxamî** | (pêrb.alv. Pêvgir) rêzman Jibo. Jibona. Jiber. Pêxemet.:Pêxamî te ez hatin vira(vê dirê). |
| **Pêxas** | (hk.l.çewa) Mirovê pêlav di pêyan da ne bit. :Pêxas dernekeve, dê stirî di piyên te ra çin!. |
| **Pêxasbûn** | (k.jn.gl.mê) Pêlav di pêyan da neman. |
| **Pêxasî** | (n.l.mê) Bê pêlavî. Pê tazî. |
| **Pêxaskirin** | (k.jn.gl.mê) Pêlav ji pîyan kirin. Pêlav danan. : Li mizgeftî divê herkes xwe pêxas bi ke. (K) bn :Kirin. |
| **Pêxember** | (karn.dar) Hilgirê nameya pîroz. Hinartî yê xudê jibo çaksazî yê ra. Pêxemberê Islamê Mihemmede (s.x). :Zerdeştê pêxember (s,x). |
| **Pêxemet** | (pêrb.alv.pêvegir) rêzman Jiber. Ji bûna. Ji pêxemet. :Em xebatê di keyn ji pêxemet azadî ya gelê xwe. Pêxamî. |
| **Pêxistin** | (k.jn.dar.mê) Hilkirin. Berdanê. :Agir pêxistin. :Cigarê pê bi xin.(K) bn :Xistin. |
| **Pêxwarin** | (k.jn.dar.mê,n.dar.mê) 1.Xwarinên mirov bi nanî di xwe, mîna mast, penîr, giyayên zerkirî, hêk û htd. : Firavîn îro pêxwarine, me çi girar ne lênane.2. Di gel da xwarin. :Kerefsê bi zadî di xon. :Nan bi çayê xwar. |
| **Pêzanîn** | (k.jn.dar.mê) Tiştê mirov agehdare û di zanit. Saloxdan. Zanîn. : Min tu pêzanîn liser çewayîya mirina wî nînin. |
| **Piçan** | (k.jn.x.mê) Bizdiyan. Qurtivîn. :Bistîka giyayî piça[piçya]. 2. Tirsan. :Ez piçam ji tirsan da. :Dilê min piça wekî min ew dehbe dîtî!.(K) : Bdn: ez di |

| | |
|---|---|
| | piçim em di piçîn, tu di piçî hûn di piçin, ew di piçe[...it] ewan di piçin. Pr :dê[bi]+ bdn. Bdb: ez di piçam em di piçan, tu di piçay hûn di piçan ew di piça ewan di piçan. Db,dûr: ez piçabûm em piçabûyn, tu piçabûy hûn piçabûn, ew piçabû ewan piçabûn. (F): bi piçe, bi piçin. |
| **PHKÎ** | (kurt) Perlemana Herêma Kurdistana Iraqê, avahîyê wê li Hewlêra paytexe. |
| **Piçandin** | (k.jn.x.mê) 1. Qurtivandin. Kherkirin.Bizdandin. : Wê bi didanan dezî piçand. ; dava giyayî piçand 2. Tirsandin. :Dengê kifêna marî dilê min piçand. (K) bdn: ez di piçînim em di piçînîn, tu di piçînî hûn di piçînin, ew di piçîne[..it] ewan di piçînin. Pr : dê[bi] piçînim, piçînîn, piçînî, piçînin, piçîne[..nit]. Bdb: di piçand, di piçandin. Db,dûr: piçandibû, … bûn. (F): bi piçîne, bi piçînin. |
| **Piçek** | (hk.x.çend) Pîçek. Kêmek. Çendek kêm. Demek kêm. :Ez piçek birçî me, piçek zadî bi de min. :Piçeka mayî dê roj ava bibit. |
| **Piçir** | (n.dar.pir) candarî Didanên singî yên piçandina parî. Kêlbe. |
| **Piçopiço** | (hn.l.çewa) Piçpiç. |
| **Piçpiç 1** | (hk.l.çewa) Kêmkêm. Hûrik. Hêdî. Pîçpîç. |
| **Piçpiç 2** | (hk.dar.çewa) Pirtpirt. :Bendikê piçpiç. |
| **Piçpiçkirin** | (k.jn.gl.mê) Pişkkirina tiştî jibo pirtên biçûk. Pirtpirtkirin. :Curdî werîs bi didanan piçpiç kir. (K) bn : Kirin. |
| **Piçpiçok** | (hk.dar.çewa) Tiştê zû di piçit. : Ev divêle gelek di piçpiçokin. |
| **Piçûk** | (hk.x.çewa) 1. Biçûk. Hûr. 2.(n.x.pir) Zarok. :Piçûk di çin nav baxî. |
| **Piçûkatî** | (hk.dar.çewa) Jiyê biçûkatîyê. :Bîrên piçûkatîyê ji bîra mirovî naçin!. |
| **Piçûkbûn** | (k.jn.l.mê) Biçûkbûn. |
| **Piçûkirin** | (k.jn.l.mê) Biçûkkirin. |
| **Pidî** | (n.x.mê) can Goştê di devî da ku didan têda rêzkirî ne.pî. pidû. Kepîr. |
| **Pido** | (n.x.nêr) can Hedamê nêrînê mîztinê yê zarokan û bi zarê zarokan. |
| **Pidû** | (n.x.mê) bn: Pidî. |
| **Pif 1** | (n.x.mê) Bayê ji devî der di kevit dema mirov lêvê xwe gurc di ket û dengê pifênê jê di hêt. Pifa wî agir geş kir. |
| **Pif 2** | (hk.x.çewa) Tiştê pirî ba. Tijî ba. Qelew. : Rûyên vî zarokî di pifin. |
| **pifbûn** | (k.jn.l.mê) Êvitîn. Qelewbûn. : Zikê kitkê pif bûye, hindî xwarina xwarî. |
| **Pifdan** | (k.jn.l.mê) Ba kirine tiştekî bi devî yan pempî, wek meşk, pifdank û htd. Bat tê kirin. : Pifdankê pfde. (K) bn : Dan. |
| **Pifdank** | (n.l.mê) 1.Lastîkeka nîva wê xuloleye[vala] rengerenge bayî tê di kin jibo ciwanî û yarîyan. Zeqzeqe.2. Mîzdank. |
| **Pifdankamîzê** | (nl.mê) bn: Mîzdan. |
| **Pifek** | (n.dar.mê) xwarin 1. Corek dindikin jibo xwarine ji pitatan yan genmokan hatîne çêkirin. 2. Pifek. ang; Yek pif. êk pif. |
| **Pifkirin 1** | (k.jn.l.mê) Bayê devî kirin derve. :Pif kir agirî jibo vemirandin yan geşkirin. (K) bn :Kirin |
| **Pifkirin 2** | (k.jn.l.mê) Direwkirin. Virkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Pifkirin 3** | (k.jn.l.mê) Batêkirin. Êvitandin. Qelewkirin. :Alekêd xwe pifkirin. |

| | |
|---|---|
| **Pijak** | (n.x.mê) 1.Çipik. Dilop.2. Dengê dilopan. Dengvedan. |
| **Pijandin** | (k.jn.x.mê) Bijandin. Belavkirin. |
| **Pijkoj** | (n.dar.mê) Bijkoj. |
| **Pijme** | (n.x.mê) Bêhnijk. |
| **Pijmîn** | (k.jn.x.mê) Bêhnijîn.(K) bdn: ez di pijmim em di pijmîn, tu di pijmî hûn di pijmin, ew di pijme[...it] ewan di pijmin. Pr:dê [bi]+bdn. Bdb: ez di pimîm em, hûn, ewan di pijmîn, tu ew di pijmî. Db,dûr: ez pijmîbûm em pijmîbûyn, tu pijmîbûy hûn pijmîbûn, ew pijmîbû ewan pijmîbûn. (F): bi pijme, bi pijmin. |
| **Pikû** | (pêrb.alv.hic) rêzman bn: Pek. Pikû eve çi tiştek seyre !. |
| **Pil 1** | (hk.x.çewa) 1.Tiştê sist. Xav. Xo negir. Bêhêz.; . Ew yê pile ko lêve bi bit. |
| **Pil 2** | (n.x.mê) Lêdana bi tibilê. Lêkdana du tibilan. Pend :Bi pilekê çû serê milekê. Ang ; zû bilind bûn. :Pilek li difna wî da. |
| **Pilan** | (n.x.mê) 1.Nexşe.2. Reşnivîs. Rojev. :Pilana te çiye?. :Te çi pilan hene?. |
| **Pilandanan** | (k.jn.l.mê) Mirov di xwaze pilanekê jibo karekî dane.:Hukmetê pilan danaye, ko hind avayîyan jibo fermanberan ava bike. (K): bn Danan. |
| **Pilandaner** | (karn.l.dn) Pisporê pilanan di deanit. |
| **Pilandarijtin** | (k.jn.l.mê) Pilandanan. Nexşe danan. |
| **Plaster** | (nbiyan.mê) nojdarî Parçe perokekê dermankirî û nîseke jibo pêçana birînan bi kar di hêt. |
| **Pilastîk** | (nbiya.mê) Lastîk. |
| **Pilbûn** | (k.jn.l.mê) Sistbûn. Leqbûn. :Didanê min yê pilbûy, dê kevit. (K) bn: Bûn. |
| **Pile** | (n.x.mê) 1.Nemre. Peyîsk. 2.Pileya germê, li Kurditanê 35 e. |
| **Pilepil** | (n.dar.mê) Pitpit. |
| **Pilepilkirin** | (k.jn.l.mê) Pitpitkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Piling** | (n.x.dz) candar Candarekê goştxwer û dirindeye. :Piling giyanewerêdirindeye. |
| **Pilîtan** | (n.dar.mê) Pêstirk. Pêpelîsk. |
| **Pilîtik** | (n.dar.mê) Parçe, pirtên nîvşil[kizir]. Pirçik. Pilîtikên pîsatî.:Wî pilîtikek berda nav şelwalê xwe. |
| **Pilîtkirin** | (k.jn.l.mê) Serfirandin . Birîn. Serjêkirin. :Stoyê mirîşkê bi gîzanê pilît kir.(K) bn: Kirin. |
| **Pilkirin** | (k.jn.l.mê) 1. Mirov di tiştekî bi xebitit ta sist bi bit, leq bibit. 2. Xavvekirina mirovekî ta qayîl bi be. : bi Xudê min yê pil kirî hema dê qayî bît.(K) bn: Kirin |
| **Pillêdan** | (k.jn.gl.mê) pil-lê-dan Mirov pilan li tiştekî bi dit. :Bapîrî pilek li cigara xwe da û got ; .... .(K) bn: Dan. |
| **Pilox** | (hk.x.çewa) Xwarina nerim jibo pidû û didanan. :Sêva pilox. Gundorê pilox. |
| **Pind 1** | (n.x.mê) candar 1. Kêzikeka kirmijoke li ser xwîna giyandaran dijît nemaze, kewalan. 2. Kilka mirîşkê ya verîçandî. |
| **Pind 2** | (hk.x.çewa) Qelew. Xir. Girover. |
| **Pindbûn** | (k.jn.l.mê) Wek pindan qelewbûn. Pifbûn. |
| **Pindepîr** | (n.l.mê) Tevinpîrk. Pîrik. |

| | |
|---|---|
| **Pindê** | (ndar,hd,gaz.mê) rêzamn Gazîkirin[navkirin] a candarê mê yan keça qelew. |
| **Pindik** | (n.dar.mê) Pijkoj. |
| **Pindikîn** | (k.jn.l.mê) Cihê xwe girtin.Pindbûn. |
| **Pindikî** | (hk.dar.çewa) Cihê xwe girtî. Xwe pind kirî. Qelew. |
| **Pindilk** | (hk.çewa,n.dar.dz) Zarokê ciwan, biçûk û qelew. |
| **Pindivandin** | (k.jn.x.mê) Torekirin.Hêriskirin. :Te bûçî zarok pindivand. (K) bdn.: ez di pindivînim em di pindivînîn, tu di pindivînî hûn di pindivînin, ew di pindivîne[....it] ewan di pindivînin. Pr: dê bi +bdn. Bdb: di pindivand, di pindivandin. Db,dûr : pindivandibû,pindivandibûn. (F): bi pindivîne, bi pinvînin. |
| **Pindivîn** | (k.jn.x. mê) Torebûn. Hêrisbûn. (K) bdn: ez di pindivim em di pendivîn, tu di pendivî hûn di pindivin, ew di pindive[…it] ewan di pindivin. Pr: dê[bi]. pindivim,pindivîn, pindivî, pindivin, pindivit[..ve]. Bdb: ez di pindivîm, em di pidivîn, tu di pindivî, hûn,ewan, di pindivîn, ew di pindivî. (F): bi pindive, bi pindivin. |
| **Pindkirin** | (k.jnlmê). Dema mirov têr di xut û zikê xwe pir di ket, nexasim zarok. Xwe pankirin (K) bn : Kirin. |
| **Pindo** | (hd,gazn.dar.nêr) tirane Gazîkirin [navkirin] a xortê qelew. |
| **Pinî** | (n.x.mê) 1.Xaleka mezin. Tewil. 2. Parçeka pateyî. Pîne ; şelwalê wî ji pinîyan tilove ye. Pend :Kun ji pinîyê mazintire.ang; dema mirov nikare bawerîya hemberê xwe bi gotinekê bîne. |
| **Pinîdoz** | (pîşn.dar.dz) Kesê karê wî pinî kirina cilik û pêlavan. |
| **Pinîdozî** | (karn.dar.mê) Karê pinîdozan. |
| **Pinîdozîkirin** | (k.jn.gl.mê) Kesê pêlav û cilikan pinî di ke. :Cîranê me pinîdozîyê di ket. |
| **Pinîkirin** | (k.jn.l.mê) 1. Lêdana parçekê bi cihê diryayî ve. Cilik pinî kirin. 2. Gotinekê jibo yekî pinî bi key. ang; pêş wîve behanekê çêkey, yan gotina wî rastve bikî. Pend : Direweka hinde mezine nahê pinîkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Pinîlêdan** | (k.jn.l.mê) bn: Pinîkirin. |
| **Pinîpinî** | (hk.l.çewa) Candar yan tiştê xal û pinî liser hene. : Kiraskê wî pinîpinî ye. :Segekê pinîpinî. |
| **Pinpinîk** | (n.dar.mê) Perwane. |
| **Pir 1** | (hk.x.çend) Gelek. Zor. Zehf. Mişe. :Eez pir ji geryanê hez di kim. :Mirovêd çak li welatê me pirin. |
| **Pir 2** | (n.x.mê) Avayî yê li ser avan, çeman yan cihên bilin hatîn çêkirin jibo derbazbûna mirov, giyandar û hin caran tirombêlan.: Pira delalê li Zaxo ye. |
| **Pirandin** | (k.jn.x.mê) Zafkirin. Mişekirin. |
| **Piranî** | (hk.dar.çend) Bara pitir. Zorbe.Behra pitir. :Piranîya xelik ê Kurdistanê kurdin. |
| **Pirbêj** | (hk.l.çewa) Mirovê pir hez ji axivtinê di ke.;Jineka pirbêj. Mêrekê pirbêj. |
| **Pirbêjî** | (n.l.mê) Axivtina zor. Gelek axivtin. |
| **Pirbûn** | (k.jn.l.mê) Tijîbûn. Miştbûn. : Xanîyê me pirî av bû. (K) bn:Bûn. |
| **Pirç** | (n.x.mê) Mûyê serî. Por. :Pirça sor, zer, reş û htd. |

| | |
|---|---|
| **Pirçandin** | (k.jn.dar.mê) bn : Piçandin. |
| **Pirçik** | (n.l.mê) Pirt. Çipik. Seçme. :Pirçikên, avê,xwînê û htd. |
| **Pirçikandin** | (k.jn.mê) Pirçandin. |
| **Pirejimar** | (hn.l.çewa) rêzman Pirînî. Gelek. |
| **Pirî** | (hn.çend) Piranî. |
| **Pirîsk** | (n.x.mê) Pirçik. |
| **Pirkam** | (hk.dar.çewa) derd Nexweşê deronî ko caran nikare xwe ragire û di qîjîne yan hêris di be. |
| **Pirkamî** | (n.dar.mê) derd Derdeke deronîye, mirovî di girit. Hîstêrya. |
| **Pirkirin** | (k.jn.l.mê) Tijîkirin. Tejikiirn. Dagirtin. : Cotyarî tovdan ji genimî pir kir. (K) bn : Kirin. |
| **Pirmîz** | (hk.l.çewa) Birmîz.:Zarokê pirmîz. :Kitika pirmîz. |
| **Pirpêne** | (n.x.mê) giya Pêrpîne. |
| **Pirpirok** | (n.dar.mê) Pelatînk. |
| **Pirs** | (n.x.mê) Pisyar. Serexoşî. :Pirsa te çiye ?. |
| **Pirsgeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê yan nivîsgeha nemaze jibo xwe dan nasîn jibo pisyarkirinê û wergirtina zanyarîyan, dema mirov li desgeh yan baregayekî karek hebit. |
| **Pirsgirêk** | (n.l.mê) Arêşe. Asteng. :Pirsgirêka me ma hilawîstî. |
| **Pirsik** | (n.x.mê) Nîşan yan girêkeke li ser leşê mirovî nemaze rûyan peyda di be ji egera kulbûnê yan li qonaxa jiyê sinêleyîyê da. |
| **Pirsîn** | (k.jn.x.mê) Pisyarkirin. Pend :Heger dixazî bizanî her bi pirse ji xudanî. (K) bdn : ez di pirsim em di pirsîn, tu di pirsî hûn di pirsin, ew di pirse [..it]ewan di pirsin. P : dê[bi] + bdn. Bdb: ez di pirsîm, em, hûn, ewan di pirsîn, tu,ew di pirsî. Db,dûr : ez pirsîbûm,em pirsîbûyn, tu pirsîbûy hûn, ewan pirsîbûn, ew pirsîbû. (F) bi pirse, bi pirsin. |
| **Pirsker** | (hk.dar.çewa) Pisyarker. |
| **Pirskirin** | (k.jn.l.mê) Pisyarkirin. (K) bn :Kirin. |
| **Pirşeng** | (hn,hk.l.çewa) 1. Gelek ciwan. Pir xweşik. 2. Navê jinane. |
| **Pirşên** | (n.dar.mê) Tîrojk. |
| **Pirt** | (n.x.mê) Ker (kher). Parçe. Pirteka sawik, nanî. |
| **Pirtbûn** | (k.jn.l.mê) Parçebûn. Kerbûn (kherbûn). (K) bn : Bûn. |
| **Pirteqal** | (n.x.mê) fêqî Core fêqîyeke, xire, reng sore, tam şirîn û mize. |
| **Pirteqalî** | (hk.dar.çewa) Rengê sorê vebî. |
| **Pirtikandin** | (k.jn.dar.mê) Hûrkirin. Kerkirin (kherkirin). Parçekirn.(K) bdn: ez di pirtikînim em di pirtikînîn, tu di pirtikînî hûn di pirtikînin, ew di pirtikîne[....it] ewan di pirtikînin. Pr : dê bi + bdn. Bdb: di pirtikand, di pirtikandin. Db,dûr : pirtikandibû, …bûn. (F): bi pirtikîne, bi pirtikînin. |
| **Pirtikîn** | (k.jn.x.mê) Parçbûn. Hincinîn. Peritîn. : Cilên wî di berda pirtikîn. |
| **Pirtir** | (hn.çend) 1. Pêtir. Pitir.2. Tijîtir. Zortir. |
| **Pirtirîn** | (hn.çend) Ji hemûyan pêtir. Ji hemûyan tejîtir. Zortir. |
| **Pirtpirt** | (hn.l.çewa) Parçeparçe. |
| **Pirtpirtbûn** | (k.jn.gl. mê) bn: Pirtbûn. |

| | |
|---|---|
| **Pirtpirtkirin** | (k.jn.gl.mê) Pirtikandin. Parçekirin. Hûrkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Pirtûk** | (nl.mê) bn: Kitêb. |
| **Pirtûkxane** | (hk.cin,n,l) Kitêbxane. |
| **Pirxandin** | (k.jn.x.mê) Xirxirkirina mirov û candarê nivistî. (K) bdn : ez di pixînim em di pirxînîn, tu di pirxînî hûn di pirxînin, ew di pirxîne[...it] ewan di pirxînin.Pr:dê bi+bdn. Bdb: di pirxand, di pirxandin. Db,dûr: pirxandibû, pirxandibûn. (F): bi pirxîne, bi pirxînin. |
| **Pirxepirxkirin** | (k.jn.gl.mê) Xirxirkirin. Pirxandin. (K) bn : Kirin. |
| **Pirxîn** | (k.jn.x.mê) Pirxandin. (K) bdn: ez di pirxim em di pirxîn, tu di pirxî hûn di pirxin, ew di pirxe[...it] ewan di pirxin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : ez di pirxîm, em, hûn, ewan di pirxîn, tu, ew di pirxî. Db,dûr : ez pirxîbûm em pirxîbûyn, tu pirxîbûy hûn pirxîbûn, ew pirxîbû ewan pirxîbûn. (F) : bi pirxe, bi pirxin. |
| **Pis** | (n.x.nêr) Nivşê daykûbaban yê nêrîn. Kur. Law.: Ew pisê mine.ang lawê mine, kurê mine. |
| **Pisandin** | (k.jn.x.mê) bn: Piçandin. |
| **Pisaxa** | (n.l.nêr,malb,n.dz) 1.Kurê axan. Malmezin. 2.Tîreka kurdane li Kurdistnê. |
| **Pisepis** | (n.dar.mê) bn: Pistepist. |
| **Pisepiskirin** | (k.jn.l.mê) bn: Pistpistkirin. |
| **Pisîk** | (n.x.dz) candar Pişîk. |
| **Pismam** | (n.l.nêr). Kurê birayê babê. Kurmam. :Araz û armanc pismamêd hevin. |
| **Pismet** | (n.l.nêr) Kurê xuşka babê. Kurmet. |
| **Pismîr** | (maln,n.l.nêr) Ji malên mîran. Kurmîr. |
| **Pisole** | (n.x.mê) Kazez yan karta navnîşan û bihayê kirîn û firotina pertalan. |
| **Pispis** | (n.dar.mê) Pisepis. |
| **Pispiskirin** | (k.jn.gl.mê) Pistepistkirin. (K) bn : Kirin. |
| **Pispor** | (karn.x.dz) Kesê di warên cuda da şarezayî hebit. Zana. Rareza. : Ew pispore di dîroka kurdan da.ang; dîrokzane. |
| **Pisporî** | (karn.dar.mê) Rarezayî. |
| **Pistepist** | (n.l.mê) Axivtina hêdî tinê alîyê havildar tê di gehit. Di guhî da axivitn. |
| **Pistepistkirin** | (k.jn.gl.mê) Pispistkirin. |
| **Pisto** | (n.dar.nêr) Parçe pateyê kirasî yê ko patika[sitoyê] mirovî di girit her du serên wî li hefkê di gehin hev yan hevdu di girin. |
| **Pistpistkirin** | (k.jn.l.mê) Di guhê hevda axivtin bêy ku kesê dî tê bi gehit. (K) bn: kirin. |
| **Pisxal** | (n.l.nêr) Kurê birayê daykê. Kurxal. |
| **Pisxalet** | (n.l.nêr) Kurê xuşka daykê. Kurxalet. |
| **Pisxaltî** | (n.l.nêr) Pisxalet. |
| **Pisyar** | (n.x.mê) 1.Heger mirovî daxazek hebit û ji kesekî bi kit, yangotin, tiştek ne xuya bit dê daxaza şirovekirinê bi kit. Pirs.: Ev pisyare gelek ya bi zehmete. Br x Bersiv.2. Çevenga pisyarkirinê. |
| **Pisyarker** | (hk.dar.çewa) Mirovê pir di pirse. Gelek pisyaran dike. Pend :Zanabe, pisyarker be. |
| **Pisyarkirin** | (k.jn.l.mê) Pirsîn.:Ez dê pisyarekê ji te kem, lê bi rastî bersiva min bi de. Brx Bersivdan. (K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Piş 1** | (n.x.mê) can Mêlaka sor. Sîh. |
| **Piş 2** | ( hk.x.çewa) Tiştê nerim. Vil. Sist. |
| **Pişê** | (ngaz.dar.mê) Gazikirin[navkirin]a pişîka mê. |
| **Pişêrandin** | (k.jn.x.mê) Bişavtin. Bijartin. |
| **Pişik** | (n.x.mê) 1. Pirt. Kher. Parçe. :Ji mitayê evsale du pişik bo cotkara ne. 2. Pirtên goştê xav, qelandî yan birajtî. :Firavîna evro pişkên goştî ne.3. Belgên hêşta ne vebûyîn.Pijkov. |
| **Pişikkirin** | (k.jn.l.mê) Lêkvekirin. Parvekirin. (K) bn: Kirin. |
| **Pişîk** | (nl.mê) Kitik. |
| **Pişkandin** | (k.jn.x.mê) Bênijîn. |
| **Pişkanê** | (n.dar.mê) Kiryara pişikkirinê. Sîstemê parvekirina mitayî, kelûpelan û htd. |
| **Pişkavtin** | (k.jn.x.mê) Bişkivîn. |
| **Pişkil** | (n.dar.mê) Pîsatî yên giyandaran yên kitkit; wek pişkilênkewal, kêrîşk, pezkûvî û htd. |
| **Pişkilkirin** | (k.jn.l.mê) Dema giyanewer pişkilan diken. Rîtin. (K) bn : Kirin. |
| **Pişkinîn** | (k.jn.x.mê) Lêgeran. Dîvçûn. |
| **Pişkîn** | (k.jn.x.mê) Bêhnijîn. |
| **Pişkovk** | (n.dar.mê) Belg yan gulên ne vebûyîn. |
| **Pişksal** | (kn.dem) Demsal. Salwext. |
| **Pişkul** | (n.dar.mê) Pişkil. Kersil. |
| **Pişo** | (hd,ngaz.nêr) Gazîkirin [navkirin]a kitkê nêr. Pend : Mereqa pişoy jije[goşt]e.ang; mirovê karek, destkevtîyek tenê bo xwe bivêt. |
| **Pişodan** | (k.jn.l.mê) Bêhinvedan. |
| **Pişpiş** | (hk.dar.çewa) 1. Wekî mirov yan xudan gazî pişîka xwe diket.2. Dengê mirovê ginginî. Yan dema xewkirinê dengê pişpişê jê di hêt. |
| **Pişpişî** | (hk.dar.çewa) Mirovê dengê pişepişê ji dev kepîyan di hêt. |
| **Pişpişkirin** | (k.jnlmê) Wekî mirov yan giyanewer pişpişê di ke. (K) bn: Kirin. |
| **Pişt** | (n.x.mê) 1.can Alîyê leşê mirovî yê piştê. : Mirov ji rexê piştê ve.: Pişta wî di êşit jiber wî barekê giran hilgirtibû. Alê piştê.:Kirasê vî zarokî yê berûpişte. Ang: pişta wî zivrandîye berî û berevajî. (hk.dem) 2. Paş. Dawî 3.(n.x.mê) Hêz. Alîkar. :Pişta te ya germe , ma dê ji çi tirsî ! Ew yê bi pişte, ang : hêzek li pişt wî ye. 4. Hawîşkirna zarokan.Piştpişt jibo kirin. |
| **Pişt** | (hk.x.çewa) Jina pûç. Orispî. |
| **Piştdan** | (k.jn.l.mê) 1. Ji bîrkirin. Pûte pê nekiirn.2. Alîkarîkirin. Piştgirtin.(K) bn : Dan. |
| **Piştdest** | (n.l.mê) Pişta destî. |
| **Pişteban** | (n.l.mê) Alîyê piştê yê banî. Pişta xanî. |
| **Pişteder** | (n.l.mê) Li şayîya jinînanê, dema veguhaztina bûkê, yek, çi jin yan mêr, dê dergehî girit û na veke û bûkê radigire ta dewatî ango mirovên zavayî diyarîyekê (pare) di denê. |
| **Piştevan** | (hn,hk.dar.çewa) 1. Alîkar. 2. Navê xortane. |
| **Piştevanî** | (n.dar.mê) Alîkarî. : Bi xebata kur û kiçên Kurdistanê û piştevanîya dostên me, welat ji sitemê rizgar bû. |

| | |
|---|---|
| **Piştgerim** | (hk.l.çewa) Kesê bawerî bi xwe heye. Xwedî heval û mirov. Bi pişt. Bi xudan. |
| **Piştgermî** | (n.l.mê) Bêminetî. : Piştgermî ya wî ji mirovên wî ye. |
| **Piştgirî** | (n.l.mê) Alîkarî. |
| **Piştgirtin** | (k.jn.l.mê) Alîkarîkirin. Harîkirin. Tagirtin.: Heger tu pişta min ne girî ez di vî karî da bi sernakevim.(K) bn : Girtin. |
| **Piştik** | (hk.l.çewa) Jina pûç. Zelamê pûç. Bêrêz. Bêsinc. Bêrewişt. |
| **Piştî** | (hk,nl.mnêr) 1.Bareke bi qayîda pişta mirovî di hê peytkirin û mirov bi pişta xwe ve di guhêzit cihê pêdvî. 2. (hk,dem,x) Paş. Paşî. :Piştî mal hemû sotî, tu di hewara me di hêy ?. |
| **Piştîk** | (n.dar.mê) 1. Piştîyek biçûk.2. (n.dar.mê) Cihekê biçûk ku di kevit pişt yan ban tiştekî. 3. (n.dar.mê) can Sêkujîya di kevit bin zikî hindav endamê mîztinê yê mirovan. |
| **Piştkov** | (hk.l.çewa) Piştkûd. |
| **Piştkûd** | (hk.l.çewa) Mirovê pişta wî xar, nexasim pîremêr û pîrejin. |
| **Piştkûdbûn** | (k.jn.gl.mê) Ji egera pîrbûn û nexweşîyan pişta mirovî di çemit. (K) bn :Bûn. |
| **Piştkûdî** | (n.l.mê) derd Piştkûd. :Egera piştkûdî ya bapîrî ji nexweşîyê ye, ne ji pîrîyê. |
| **Piştkûdkirin** | (k.jn.l.mê) Mirovê li rêveçûnê pişta xwe kûd di ket. Di çemîne. (K) bn: Kirin. |
| **Piştpê** | (n.l.mê) Pişta pêyî. Banê pêyî. |
| **Piştpişt** | (hn.l.mê) deng Dengeke jibo zarokên sava di bêjin, da hawî bi bit yan keyfa wî bi hê, bi kenit. |
| **Piştpiştkirin** | (k.jn.gl.mê) Piştpit jibo zarokan gotin. (K) bn : Kirim. |
| **Piştrast** | (hk.l.çewa) Bawerî bi xwe hebûn. Bi hîvî.Dilinya.: Ez ji wî piştrastim dê di ezmûnên xwe da serkevit. |
| **Piştrastbûn** | (k.jn.gl.mê) Dilinyabûn. : Piştrast be ez te na hêlim bitinê. (K) bn: Bûn. |
| **Piştrastî** | (n.l.mê) Bawerî. Dilinyayî. |
| **Piştrastkirin** | (k.jn.gl.mê) Bi hîvî êxistin. Dilinyakirin.(K) bn : Kirin. |
| **Piştre** | (hk.dem) Paşî. Dûre. |
| **Piştûpişt** | (hk.l.çewa) 1. Paşve. Bo piştê. Bo alîyê piştê. : Pêyên wî jiber çûn, piştûpişt bi erdî kevt. |
| **Piştûpiştçûn** | (k.jn.gl.mê) Wekî mirov ji tirsan, henek yan lîstin bi alîyê piştê ve di çit bêyî rûyê xwe bi zivrînit[vegerîne].:Tirombêl pi tûpi t di çe. (K) bn: Çûn. |
| **Piştxar** | (hk.l.çewa) bn: Piştkûd. |
| **Piştxarî** | (n.l.mê) bn: pi tkûdî. |
| **Pişû 2** | (n.x) Bêhinvedan. |
| **Pit 1** | (hn.x.çewa) Girover. Xir. Ciwan. |
| **Pit 2** | (n.x.nêr) Xudayên ji kevir û daran di hatîn diriskirin, hindek miletan di peristin. Pot. |
| **Pit 3** | (n.x.mê) deng Dengê bayek biçûk ko ji cihekî derdi kevit. |

| | |
|---|---|
| **Pitat** | (nx.mê) giya 1. Giyayeke di hêt çandin mifa ji berê wî di hêt wergirtin. 2. Serikên pitatê êwe xir, hêk û htd. Gelek corên xwarinê jê di hên çêkirin. Kirtopk. |
| **Pitax** | (n.x.mê) Xolî. Xwelî. |
| **Pitepit** | (n.dar.mê) Pitpit. Gazin. Birmebirm. |
| **Pitepitî** | (hk.dar.çewa) Mirovê devgazin. Mirovê hertim pitpitê dike. : Jinka pipitî. |
| **Pitepitkirin** | (k.jn.l.mê) Gazindekirin. Mirov pitepitê di ke. (K) bn: Kirin. |
| **Pitew** | (hk.x.çewa) Qayîm. Mikum. |
| **Pitê** | (hd,gaz,n.mê) Gazîkirin[ navkirina] kiçik yan jina qelew, hûr ûciwan. |
| **Pitir** | (hk.çend) Zortir. Gelektit. Pêtir. |
| **Pitirî** | (hk,çend ) Piranî. Bara pitir. |
| **Pito** | (hk.hd,gaz.nêr) Gazîkirin yan naznava xortê qelew û girover. |
| **Pitpit** | (n.dar.mê) Gazinde. Pindepind. |
| **Pitpitî** | (hn.dar.çewa) Mirovê her gav pitepitê di ke. Hez ji pitpitê dike. Devgazinde. |
| **Pitpitkirin** | (k.jn.l.mê) Gazindekirin. Pir gotin. (K) bn : Kirin. |
| **Piv** | (n.x.mê) Bayê bi deng yê ji paşîyê der di kevit. |
| **Pivdank** | (n.dar.mê) bn :Pifdank. |
| **Pivken** | (hk.dar.çewa) Mirovê pivan di ket. |
| **Pivkirin** | (k.jn.l.mê) Derkevtina bayê nav zikî. (K) bn : Kirin. |
| **Pix** | (n.x.mê) deng Dengek taybete jibo tirsandinê bi kar di hînin. |
| **Pixkirin** | (k.jn.l.mê) 1. Weke mirov xeweka giran da bit û dengê pixpixê ji mirovî bi hêt. :Hevalî yê pixkirî ye xewê. 2. Dema hajûtina karikan dengê pixpixê di ken dako bi çin.3. Eger mirovî bi vêt êkî bi tirsîne dê dengê pixênê ji xwe bi hîne. : Pixkirê. (K) bn : Kirin. |
| **Pixok** | (n.dar.mê) Tiveng bi zarê taybet yê zaroyan. |
| **Piyade** | (hk.dar.çewa) Mirovên bi pêyan bi rê di gerin. Peyade. |
| **Piyale** | (ndar.mê)Şûşeyên vexwarina çayê. Peyale. |
| **Piyano** | (nbiya.mê) mûzîk Amêrek mûzîkê ye. |
| **Piyase** | (n.dar.mê) Bi rêveçûna hêdî. Hatinûçûneka hêdî. Li ser [pêyên]xwe geryan. Geryan. |
| **Piyasekirin** | (k.jn.l.mê) Wekî mirov li ser pêyan hêdî di gere. Hatinûçûna hêdî.:Dê ka werin da piyasekê bi kîn, berîya firavîn berhev di be. (K) bn:Kirin. |
| **Piyaw** | (n.x.nêr) bn : Peya .Zelam. |
| **Piz** | (n.x.mê) Zaro yan têjikê candaran yê di zikê dayk yan makêda. Sava. Têjik. |
| **Pizdan** | (n.dar.mê) Cihê zaro, yan têjikên giyandaran têda dirist dibe, di nav zikî da. |
| **Pizê** | (hn.hd,gazmê) Naznav yan gazîkirina zaroka sava. |
| **Pizînk** | (n.dar.nêr) Memik yan mêjokê lastîkî, yê di kin di devê zarokên sava da, dako tena bi bin. |
| **Pizîşk** | (pî n.x.dz) Dixtor. Diktor. Nojdar. |
| **Pizîşkî** | (karn.dar.mê) Nojdarî. |
| **Pizo** | (hn,pesin.nêr) Naznav yan gazikirina zarokê sava. |

| | |
|---|---|
| **Pî 1** | (n.x.nê) can Pê.Ling. |
| **Pî 2** | (n.x.mê) can Pidî. |
| **Pîç** | (hk.x.çewa) Nebaş. Neçak. Neqenc. Pûç. Kêrnehatî. Bêbiha. Bêrûmet. Xirş . |
| **Pîçatî** | (n.dar.mê) Karên pîç. Kiryarên nebaş. Pûçatî. |
| **Pîçbûn** | (k.jn.l.mê) Dema ti tek, xwarin genî, gemar di be yan mirov ji rêya rast der di kevit. Pûçbûn. (K) bn : Bûn. |
| **Pîçek 1** | (hk.dar.çewa) Mirovê pîç. Mirovê kêrnehatî. |
| **Pîçek 2** | (hk.x.çend) Hindik. Kêm. Piçek.: Pîçek ya may dê roj avabit. |
| **Pîçê** | (hn.gaz.mê) Jina bi kêrnehatî. Jina pîç. |
| **Pîçkirin** | (k.jn.l.mê) Weke mirov tiştekî bê biha bi ke. Mirov karekî têk bi de. Pûçkirin. (K) bn : Kirin. |
| **Pîço** | (hn.gaz.nêr) Zelamê. Peyayê pîç. |
| **Pîçpîç** | (hn.çend) Hindikhindik. Piçpiçe. Kêmkême. :Pîçpîç ezê tê di gehim. |
| **Pîdza** | (n.biyan.mê) Corek sawikane bi goşt, penîr, kivarik û gelek xwarinên din têkel kirîne. |
| **Pîk 1** | (n.x.mê) 1. deng Dengek zirav ji encama der kevtina bayî ji dev, pivdank û htd peyda di be. 2. Pîka zirnayê, dudikê bilorê û htd ya bi pifkirina hêza bayî dengek xweş û nazik jê peyda dibit. |
| **Pîk 2** | (n.x.mê) 2. Pişka dara ter ya berhevkirî jibo pîk yan petromekirinê. |
| **Pîkeb** | (n.biyan.mê) Corek tirombêlane. |
| **Pîkkirin 1** | (k.jn.l.mê) Wekî mirov pi keka dareka ter li dareka din di de jibo berek ba tir peyda bi bit. |
| **Pîkkirin 2** | (k.jn.l.mê) deng Dema ba ji ber yekî di hêt dengek wek pîkê jê bi hêt. (K) bn : kirin. |
| **Pîl 1** | (n.x.nêr) Parçe kaxezkeka biçûke, wêne û nivêsîn li ser rexekî nexşandîne alê din yê nîseke, li bergnameyan di din wek giroveya pareyê şandinê. |
| **Pîl 2** | (n.x.mê) Patirîyên radyo, tomar, demhijmêr û htd. |
| **Pîla** | (n.x.mê) 1. Core asinekê req û gelek qayîme. Pola. 2. Nîşana hêz û xweragirîyê ye. |
| **Pîlan** | (n.x.mê) Pêkola jinavbirin yan lewazkirinabizavekê. :Darijtina nexşeyên neyînî dijî kes yan desteyekê.:Pîlanêd dujminî jibo vemirandina bizava gelê kurd bingor bûn. |
| **Pîlangêran** | (k.jn.l.mê) Pîlan dijî alîyekî encam dan. |
| **Pîlankirin** | (k.jn.l.mê) Pîlangêran. : Neyar di xwazin dijî me pîlanan bi kin. |
| **Pîlik 1** | (n.x.nêr) Kesê navbera malên bûk û zava hatinûçûnê di ke ji serûberkirina karê şayî yê. Postevan. Teter. |
| **Pîlik 2** | (n.x.nêr) Amanek lûleyî ye şîrî jibo zarokan tê di xin. Memik. |
| **Pînce** | (n.x.nêr) Parçe. Pinî. Pirt. Seçme. |
| **Pîng** | (n.x.nêr) giya Giyayekê kesk û bêhinxweşe, li ser çok û beravan hişîn di be. |
| **Pîq 1** | (n.x.mê) 1. Baskên pêyên mirovan. Baq. |
| **Pîq 2** | (n.x.mê) Pîsatîyê ron yê giyandaran. Fîş . |
| **Pîr 1** | (hk.x.çewa) Jîdirêj. Bi temen. Kevin. :Pîremêrekê pîr. Jineka pîr,.Bizina pîr. |
| **Pîr 2** | (karn.x) Yek ji texeyên oldarên dînê êzdîyan. |

| | |
|---|---|
| **Pîran** | (hk.cihdevern) 1.Devere, gundeke li Kurdistana bakûr.Wargeha şêx Se`îdê Pîran.2. Navê xortane. |
| **Pîratî** | (n.dar.mê) Navsalveçûn. Kevinî. Pend: pîratî û hizar derd. Pend :Mirin heba, pîratî tuneba. |
| **Pîrbûn** | (k.jn.l.mê) bi Navsalveçûn. Kevinbûn. Pend :Ez pîrbûm lê dil pîr nabit. (K) bn: Bûn. |
| **Pîrebizin** | (n.l.mê) Bizin a pîr. |
| **Pîrejin** | (n.l.mê) Jina bi navsalveçûyî. Jina pîr. |
| **Pîrek** | (n.x.mê) Jin . Afret. |
| **Pîremêr** | (n.l.nêr) Zelamê pîr. Mêrê pîr. Kevnemêr. Qertemêr. |
| **Pîreseg** | (n.l.nêr) Seyê pîr. |
| **Pîrê** | (hn.hd,gaz.mê) Naznav û gazîkirina jina pîr yan dapîrê. |
| **Pîrhevî** | (n.dar.mê) Di çîrokan da pîrejinên sêrebaz, kirêt, kêlbedirêj, li gêzikan siyar di bin û dengê kenîyeka kirêt ji xwe di hînin, zarokan di dizin ji xwere di kin xizmetkar. |
| **Pîrhevok** | (n.dar.mê) Pîrhevî. |
| **Pîrik 1** | (n.dar.mê) 1.Dapîr.2. Dapîroşk. |
| **Pîrik 2** | (n.dar.mê) candar Tevinpîrk. |
| **Pîris** | (hk,cugirn) 1. Çiyayeke li devera Akrê, Kurdistana Iraqê.2. Navekê kurdî yê mêrane. |
| **Pîrî** | (n.dar.mê) bn: Pîratî. |
| **Pîrkirin** | (k.jn.l.mê) Kevinkirin. : Xem û kovanan em pîr kirîn. :Ez pîr nebûm, te ez pîr kirim. (K) bn: Kirin. |
| **Pîrmem** | (hkcih.l) Bajêrkekê ciwan û havîgeheka dilvekere, ser bi Hewlêrê ve li Kurdistana Iraqê. Selahedin. |
| **Pîroz** | (hk.n.x.çewa) 1.Tiştê xelik rêzê lê di girin. Bi rûmet. Cihê pîroz. Navê pîroz. Bîranînên pîroz. :Rojên pîroz. 2. Navê pîrekane. |
| **Pîrozbayî** | (n.dar.mê) bn : Pîrozî. |
| **Pîrozî** | (n.dar.mê) Pîrozkirin. : Em çûn pîrozî ya xanîyê dostê xwe. |
| **Pîrozkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov li hilkeftekê, cejnekê daxaza serfirazîyê û borandina demek xwe  û dileveker bo kes yan alîyekî bi ket. :Cejna hewe pîroz bit. şayî ya hewe pîroz be. Cejna bûna te pîroz bit. |
| **Pîrozname** | (n.l.mê) Kart yan kaxezeke mirov ji hevalek yan nasekî ra di hinêrit, bi helkefteka xwe , têda mirov aheng, cejin, yan keyfa wan pîroz di ke. |
| **Pîrûpend** | (n.l.mê) Mamik. Têderxistinok. |
| **Pîrt** | (n.x.nêr) Komeka mûyan. Por. Pirç. Mû. Pend :Mêrê bi pîrt. |
| **Pîs** | (hk.x.çewa) Gemar. Herimî. Nepaqij. Qirêjî. |
| **Pîsatî** | (n.dar.mê) Tiştê pîs. Gemar. Pîsî. |
| **Pîsbûn** | (k.jn.l.mê) Wekî ti tek, mitayek, mirovek û htd, pîs di bit. Gemarbûn. Genîbûn. :Ev ave ya pîs bûy!.:Gora te gelek pîs bi bû!.(K) bn: Bûn. |
| **Pîsê** | (hn.gaz.dar.mê) Jina pîs.Jima kirêt. |
| **Pîsî** | (n.dar.mê) Ti tê pîs. Pîsayî. Pîsatî. |

| | |
|---|---|
| **Pîskirin** | (k.jn.l.mê) Herimandin. Gemarkirin. : Vî zarokî yê xwe pîs kirî. :Min destên xwe pîs kiirn. (K) bn: Kirin. |
| **Pîso** | (hn.gaz.dar.nêr) Zelamê pîs. Mêrê gemar. |
| **Pîst** | (n.x.nêr) can 1.Çerim ê giyandaran piştî tamdan û xweşkirin[peytkirin]ê xwerinên rêçalî di xin nav, wek jajî û penîr.2.Çerim. |
| **Pîş** | (n.x.nêr) Giyayê behî. Hi ik. Pelex. Pend :Palê pîşî. ang ; karê çi pêve nehêt. |
| **Pîşangeh** | (hk.cih,n.dar.mê) 1.Cihê nî adana kelûpalan. 2. Cihê firotina kelûpelan.firoşgeh. |
| **Pîşe** | (n.x.mê) Zanîn û xwandina mirovî jibo karî. Kar. Karbend. |
| **Pît** | (nx.mê) Pêkahatîya peyvan. Bêje. Tîp. :Pîta êkê ji peyva welat ;w; e |
| **Pîte** | (n.x.mê) Giringî. Sexbêrî. |
| **Pîtedan** | pîtepêdan (k.jn.l.mê) Giringî pê dan. Pîte pê dan. (K) bn: Dan. |
| **Pîtepêkirin** | (k.jn.l.mê) Giringî pêdan. :Evro seyday gelek pîte bi havalî di kir!. (K) bn: Kirin. |
| **Pîtepênekirin** | (k.jn.l.mê) Piştguh ve havêtin. Xwe bi serve ne birin.: Ez di ber ra çûm, min çi pîte pê nekir. :Seydayê çi pîte bi min ne kir, diyare yê sile. (K) bn : Kirin. |
| **Pîvan** | (k.jn.x.mê) Hilsengandin. Sengandin. Kêşan. Baristekirin. (K) bdn: ez di pîvim em di pîvîn, tu di pîvî hûn di pîvin, ew di pîve […it] ewan di pîvin. Pr: dê [bi] pîvim, pîvîn, pîvî, pîvin, pîve[..ve], pîvin. Bdb: di pîva, di pîvan. Db,dûr: pîvabû, pîvabûn. (F): bi pîve, bi pîvin. |
| **Pîvandin** | (k.jn.x.mê) Pîvan. Baristekirin. Di pîvînit, bi pîvînin. |
| **Pîvaz** | (n.x.mê) giya Mitayeke serik û bistî yên wî jibo xwarinê mifa jê di hêt wergirtin, tama wê tîj yan şirîne şêwe xir yan hêkî ye , rengên sipî û sor hene. Pîvaza ;sor, sipî, şirîn û tîj. Pend :Yê pîvazê ne xwe bêhin ji devî nahêt.ang mirov na havêt çi kesan heger karek şaş ne kiribe. |
| **Pîvazok** | (n.dar.mê) giya 1.Pîvaza ter. Pîvaztek.2. Serik. Serikên hinde gulan. |
| **Pîvazterk** | (n.l.mê) giya Pîvazên ter,yên begên wan hêjta di kesik û bi kêr xwarinê di hên. hi în. Pîvazok. |
| **Pîver** | (n.dar.nêr) endaze Yekeya pîvana tiştan. Terazî. Terazo. |
| **Pîvok** | (n.x.mê) giya Giyanekê kûvî ye serikekê sipî di nav pîşkekî da heye û tinê pitatka wî di hêt xwarin. |
| **Pîyase** | (hn.l.mê) bn: Piyase. |
| **Pîz** | (n.x.mê) giya Giyayekê tere li ber avan hişîn di bit û bi terî di hêt xwarin. |
| **Pîzang** | (n.x.mê) Stêng. |
| **PKK** | (kurt) Parteka sîyasî ya kurdî ye li Kurdistana Tirkî, bi nave ;Partîya Karkerên Kurdistanê. |
| **Pol** | (n.x.mê) Rêzên xwandinê. : Birayê min li pola pêncê ye. |
| **Pola** | (n.x.mê) Pîla. |
| **Polîs** | (karn.x.dz) Fermanbereke bi cilên fermî, karê wî paraztina yasa, can û malê xelikî ye. |
| **Polîsxane** | (hk.cih,n.dar.mê) Baregehê polîsan. |
| **Polonya** | (hk.cih,welatn.cih) Walatekêewropa rojhitî ye. |
| **Polonî** | (nejad.l) 1. Xelkê Polonya. 2. Mitayê Polonî. 3. Zimanê Polonî. |

| | |
|---|---|
| **Ponijîn** | (k.jn.x.mê) Hizirkirin. Bêdeng man. (K) bdn: ez diponijim, em di pnijîn, tu di ponijî hûn di ponijin, ew di ponije[...it] ewan di ponijn. Pr : dê [bi ]ponijim, ponijî, ponijin,..Bdb : ez di ponijîm, em, hûn,ewan di ponijîn, tu,ew di ponijî. Db,dûr : ez ponijîbûm em ponijîbûyn(bûn), tu ponijîbûy hûn, ewan ponijîbûn, ew ponijîbû. (F) :bi ponije, bi ponijin. |
| **Por 1** | (n.x.mê) Pirç. :Pora sor. :Pora zer. :Pora kurt. :Pora dirêj. |
| **Por 2** | (n.x.dz) balinde Perindeyekê hêkkere, dengxweşe, di nav daristan û rezan da di jît. |
| **Porpor** | (n.dar.mê) Pitpit. Pitepit. Pilepil. |
| **Posîde** | (hk.x.çewa) Mirovê bêgêwil. Têkçûyî. Mirûto. :Te çiye tu hosa yê posîde?. |
| **Posîdebûn** | (k.jn.l.mê) Wekî mirov bê gêwil di be.: Duh tu gelekê posîde bûy te çi bo? (K) bn: Bûn. |
| **Posîdekirin** | (k.jn.l.mê) Hêriskirin. Bêgêwilkirin. :Xwe posîde neke!. |
| **Post 1** | (n.x.mê) Name. |
| **Post 2** | (n.x.nêr) can Pîst. |
| **Posteçî** | (karn, l.dz) Mirovê karê poste ve guhastinê di ket. Teter. Postevan. |
| **Postevan** | (karn.dar.dz) Poseçî. |
| **Postxane** | (hk.cih,n.dar.mê) Avayî karên poteyî. |
| **Poş** | (hk.x.çewa) Rengê sipî yê ser şînî ve. :Pirça nîvnîve sipî û reş,wek şîn xuya di ke. Bizina poş, pora poş. :Pora wê ya poşe. |
| **Poşbûn** | (k.jn.l.mê) Dema pora serê mirovî sipî di bit. (K) bn:Bûn. |
| **Poşî** | (n.x.mê) Xêlî. Dersok. |
| **Poşîreş** | (hn.l.çewa) Mirovê poşîya reş di ke serê xwe, nexasim jin. |
| **Poşîreşk** | (n.l.mê) candar Corek kirmikane li biharan peyda di bin. Zarok stranan jêra di bêjin û destan di qutin [ qutim, qutim poşîreş, kiras sorê biharê] û ew di gel awazê di leyzin. |
| **Poşman** | (hn,hk.x.çewa) bn: Peşêman. |
| **Poşmanbûn** | (k.jn.l.mê) bn: Peşêmanbûn. |
| **Poşmanî** | (n.dar.mê) bn: Peşêmanî. |
| **Poşmankirin** | (k.jn.l.mê) Peşênkirin. |
| **Poxîn** | (n.x.mê) Xwarineke, arê genim, nok, xurnîfk û htd di gel şekirê têkelkirî ye. |
| **Poz** | (n.x.nêr) 1.Difin. Kepî. 2. Paşî. |
| **Pozbadan** | (k.jn.l.mê) Xwe mirûtokirin. Difinbadan. |
| **Pozberan** | (hk.l.çewa) Mirovê kepîya wî wek a beranane.Difinberan. |
| **Pozbilind** | (hk.l.çewa) Difinbilind. |
| **Pozbilindî** | (n.l.mê) Difinbilindî. |
| **Pozxane** | (hk.cih) Girtîgeh. |
| **Proje** | (n.x.nêr) Nexşe. Pilan. Karname. |
| **Program** | (nbiyan.x.mê) Bername. |
| **Propagenda** | (n.dar.biyan.mê) Ragehandina berdij ya lewazkirina û jinav birina projeyên dujmin yan hevrikan. |
| **Prose** | (hnx,biyan.mê) Bizava bêkuta jibo bi cih înana nexşeyên darijtî, kar bo hatî kirin. Proseya dengdanê, aşitî yê û htd. |

| | |
|---|---|
| **Prove** | (hn.biyan.mê) Xwe berhev kirin jibo encamdana çelengîyeka , hunerî, siyasî û htd. Rahatin. |
| **Puxte** | (n.x) Naverok. |
| **Pûç** | (hk.x.çewa) bn: Pîç. |
| **Pûçatî** | (n.dar.mê) bn: Pîçatî. |
| **Pûçbûn** | (k.jn.l.mê) bn: Pîçbûn. |
| **Pûçî** | (ndar.mê) Pûçatî. |
| **Pûçkirin** | (k.jnlmê) bn: Pîçkirin. |
| **Pûjan** | (n.x.mê) Pîng. |
| **Pûl** | (n.x.nêr) Pîl. |
| **Pûr** | (n.x.mê) Avdestxane. Destavxane. |
| **Pûrt** | (n.x.nêr) Pîrt. |
| **Pûş** | (n.x.nêr) Pwîş |
| **Pûşî** | (n.x.mê) Hîşar. kefîk. Kesrewan. |
| **Pût** | (n.x.mê) Bêlava nerim ji pateyî , bendikan. Kale. |
| **Pûte** | (n.x.mê) Pîte. |
| **Pûtepêdan** | (k.jn.l.mê) Pîtedan. |
| **Pûtepêkirin** | (k.jn.l.mê) Pîtepêkirin. |
| **Pûtîn** | (nl.mê) bn: Pût. |
| **Pwîte** | , bn: Pîte. |
| **PYSK** | (kurt) Partîya Yeketîya Sosyalîsta Kurdistan. Li 21-27.04.1996 hatîye avakirin. |

# Q

| | |
|---|---|
| **Q** | (qe) Pîta bîstê ji abeya kurdî. |
| **Qaç** | (nx.mê) darûbar bn :Hevrist. |
| **Qaçax** | (hk.x.çewa) 1.Bazirganîya nerewa. Karê nerewa. 2. Ji |
| | derveyî qanûnê.3. Navek kurdî yê mêrane. |
| **Qaçaxbûn** | (k.jn.l.mê) Revîn ji qanûnê, ji zorîyê, ji sitemê. Der bi der bûn.(K) bn: Bûn. |
| **Qaçaxçî** | (karn.dar.dz) Bazirganê mita û karên qaçax. |
| **Qaçaxçîyatî** | (karn.dar.mê) Karê qaçax. Karê nerewa. |
| **Qaçik** | (n.dar.mê) giya Corekê giyayî ye wek benîştî di cûn. |
| **Qaçikêşivanî** | (n.l.nêr) giya Giyayek rengê wî boze, şivan di xin divê xweda mîna benîştî di cûn. |
| **Qad** | (n.x.mê) Meydan. Cih. Delîve. :Qada xebatê, qada pevçûnê, xwandinê û htd. |
| **Qadûk** | (n.x.mê) Setil. |
| **Qaf** | (n.x.nêr) Tiştê req û vala, xilûle wek tirarî .Qafê serî, :Nojdarî qafê serê wî rakir. Qafê kulindî.:Qafê gulan û htd. Fikev. |
| **Qafbûn** | (k.jn.l.mê) Pirtbûn. Kerbûn(kherbûn). :Serê wî qaf bû. |
| **Qafê** | (hk.cih,n.x.mê) Çiyayek evsaneyîye, di çîvanokan da heye. |
| **Qafik** | (n.dar.nêr) Amanek şêwe lûleyîye ji axa cerikan çê di ken. Cerik.Guldan. Tirar. |
| **Qafkirin** | (k.jn.l.mê) Pirtkirina wek qafan. :Serî wî qaf kir. (K) bn: Kirin. |
| **Qafqaf** | (hn.l) Pirtên wek qafan, wek tiraran. Pirtpirt. |
| **Qafqafbûn** | (k.jn.l.mê) Pirtikîn. :Cer ji milî keft qafqaf bû. |
| **Qafqafkirin** | (k.jn.gl.mê) bn: Qafkirin. |
| **Qaj** | (n.x.mê) Morik. Morika gustîlkê. |
| **Qajeqaj** | (n.l.mê) deng 1. Qîjeqîj. 2. Dengê qelereşkan. |
| **Qajeqajkirin** | (k.jn.gl.mê) Qareqarkirin. Qîjeqîjkirin. (K) bn:Kirin. |
| **Qajên** | (n.dar.mê) deng Qîjên. Qajeqaj. |
| **Qajênkirin** | (k.jn.l.mê) Qîjandin. |
| **Qal** | (n.x.mê) Pirteka req, pan û tenik. |
| **Qalib** | (n.x.nêr) Bergek req û qayîme jibo têxistin û peytkirina tiştî. Qalibê libneyan, bilokan birînê; bilokan têda dirist di ken dako hemû wek yek der bên. |
| **Qalik** | (n.x.mê) 1.Amankên valakirî, elbikên valakirî. Qalikên fîşkekan; fîşekên hatîn bi kar anîn[teqandin]. 2. Kavlan. Qalika şûrî, xencerê. |
| **Qam 1** | (nx.mê) Rex. Al. |
| **Qam 2** | (n.x.mê) Bejin. |
| **Qam 3** | (hk.x.çewa) Rewşt. Sinc.:Mirovek bi qame, qamdare, bi since. :Zarokekê bêqame; ang nerawestay. Nehecimî. |

| | |
|---|---|
| **Qamçî** | (n.x.mê) Kinifekê reqe destikek heye jibo lêda[qutan]ê bi kar dihînin. Darxîç. |
| **Qamçîkirin** | (k.jn.l.mê) Bi qamçîyan lêxistin. Qamçî lêdan. |
| **Qamçîlêdan** | (k.jn.l.mê) Qamçîkirin. |
| **Qamçîlêxistin** | (k.jn.gl.mê) Qamçîkirin. |
| **Qamdar** | (hk.dar.çewa) Bi sinc. Sincan. Xwedî rewşt. |
| **Qame** | (n.x.nêr) Sator yan kêrikek, bi serê tivengan ve ye jibo karên leşkerî bikar dihêt.Qeme. |
| **Qamik** | (n.dar.pir) 1. Girêçikên tilîyên destê mirovî. 2. Tilîya beranî. |
| **Qamiş** | (n.x.mê) Qamîş. |
| **Qamîş** | (nx.mê) Leven . Qerem. |
| **Qamîşlo** | (hk.cih,curig.n) Bajêreke li Kurdistanê- Sûrya. |
| **Qanûn** | (n.x.mê) Yasa. |
| **Qanûnî** | (hk.dar.çewa) Yasayî. |
| **Qanûnvan** | (karn.dar.dz) Pisporê warê zanîna qanûnê.Yasavan. |
| **Qanûnzan** | (karn.dar.dz) Qanûnvan. |
| **Qap** | (n.x.mê) Gotina ji qebarê xwe mezintir. Axivtina gir û qelew. |
| **Qapberdan** | (k.jn.l.mê) Mirovê gotinên ji ji xwe mezintir bi ke. (K) bn: Berdan. |
| **Qapê** | (hdgazn.dar..mê) Navkirin[gazîkirin]a jina bi qap. Axivtinmezin. |
| **Qapik** | (n.l.mê) Dergehk. Dervank . Derpoşk. |
| **Qapo** | (hd,ngazn.dar.nêr) Navkirin[gazîkirin]a mêrê bi qap.Axivtinmezin. |
| **Qapût** | (n.x.nêr) Sako. Qemsele. |
| **Qarandin** | (k.jn.x.mê) Qîjandin. (K) bdn: ez di qarînim em di qarînîn, tu di qarînî hûn di qarînin, ew di qarîne[...it] ewan di qarînin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : di qarandi, di qarandin.Db,dûr : qarandibû , qarandibûn. (F) : bi qarîne, bi qarînin. |
| **Qareman** | (hn,hk,.dar.çewa) Qehreman. |
| **Qareqar** | (n.dar.mê) bn: Karekar.Qêjî. |
| **Qareqarkirin** | (k.jn.gl.mê) Qîjandin. Qîjkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Qarê** | (n.dar.mê) yarî Lîztikên zarokane di ken qêrî bi gotina {qarê}û bi lez baz di din bêyî bêhina xwe bînin ta di gehin cihê desnîşankirî. |
| **Qarên** | (n.dar.mê) deng Dengek bilind ji xwe derêxistin, ji encama tirs, yan janan. :Dema nojdarî birîna zarokî derman di kir,qarên jê hat. Qîjên. |
| **Qarik** | (hk.dar.çewa) Mirovê bêçare. Mirovê lewaz. |
| **Qarome** | (n.x.nêr) Qerome. |
| **Qaş** | (n.x.mê) Morîka ciwan a di nav gustîl û ristikan da.: Qaşa gustîla min ya şîne. |
| **Qaşkirin** | (k.jn.l.mê) 1.Nexşandin.2.Qaş liser danan. |
| **Qawe** | (n.x.mê) Qehwe. |
| **Qayde** | (hk.x.çewa) Bi qayde , Bi kêr di hêt. Fît. : Ev pêlave bi qayîda pêyên mine. |
| **Qayîk** | (n.x.mê) Belem. Kelek. |
| **Qayîkvan** | (karn.dz.dz) Kelekvan. |
| **Qayîl** | (hk.x.çewa) Nedij. Pêra. Razî. |

| | |
|---|---|
| **Qayîlbûn** | (k.jn.l.mê) Pejirandin. Hatin ser rê. :Birayê wê pir hîvî jê kirin, ko qayîl bi be mêr bi ke.(K) bn: Bûn. |
| **Qayîlkirin** | (k.jn.l.mê) Razîkirin. Serrêkirin.(K) bn: Kirin. |
| **Qayîm** | (hk.x.çewa) Bi hêz. Tund. |
| **Qayîmbûn** | (k.jn.l.mê) Tundbûn. Bi hêzbûn. : Hindî banî bi gêrî pitir qayîm di bit.(K) bn: Bûn. |
| **Qayîmî** | (n.dar.mê) Hêz. Tundî. |
| **Qayîmkirin** | (k.jn.l.mê) Tundkirin. Bi hêzkirin. :Xwe qayîm bi ke, gelek nemaye, dê gehîn serê çiyayî!.. |
| **Qayîmtir** | (n.hevber) Tundtir. |
| **Qayîmtirîn** | (n.hevber) Tundtirîn. Ji heman tundtir. |
| **Qayîş** | (n.x.mê) Parçek pan û dirêje ji çemê giyandaran, perok, yan naylonî hatî ye çêkirin, mirov jibo girêdan û tundkirina pişta xwe, yan peytkirina bar û tiştên din bi kar di hînin. Kemer. Davek. |
| **Qaz** | (n.x.mê) balinde Firindeyekê hêkker , hi/kavîye,kûvî yan kehî ye. |
| **Qazan** | (n.x.mê) Amanê kelandina avê yan lênana zadî. Mencel. |
| **Qazî** | (n.biyan.nêr) Zanayê ola Isamê. |
| **Qazîbaz** | (n.l.mê) kêzik Kêzikeka ciwan û perrengîne, zarok yarîyan pê di ken. |
| **Qazîbezînk** | (n.l.mê) Qazîbaz. |
| **Qebare** | (n.x.mê) Mezinîya tenan. Mezinîna amanên ragirtina tiştî. |
| **Qebe** | (hk.çewa.çewa) Gir. Mezin. Ava. :Ewê henê çendê qebeye, dê bêjî mîre!. |
| **Qebekirin** | (k.jn.l.mê) Xwe qebekirin. xwe ragirtin. Xwe mezinkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Qebiz** | (hk.x.çewa) Wekî desnivêja mirovî nîvreq di bit. : Ev zaroke yê qebize.ang; bi zehmet desnivêjê di ke. Pr ×Hinavêş. |
| **Qebizbûn** | (k.jn.l.mê) Mirov û candaran toşî qebizîyê di bin. (K) bn: Bûn. |
| **Qebizî** | (n.dar.mê) derd Qebizbûn. |
| **Qbizkirin** | (k.jn.l.mê) Qebizbûn. : Zadê xwaringehan ezê qebiz kirîm. (K) bn: Kirin |
| **Qebîn** | (k.jn.x.mê) Dema kew di xwînit. Di qebit. Xurîna kewan. Xwandina kewan. Lêheytandin. lêxurîn. (K) bdn: ez di qebim em di qibîn, tu di qebî hûn di qebin, ew di qebe[...it] ewan di qebin. Pr :dê[bi] +bdn. Bdb: ez di qebîm em di qebîn, tu di qebî hûn di qebîn, ew di qebî ewan di qebûn. Db,dûr: ez qebîbûn em qebîbûyn, tu qebîbûy hûn qebîbûn, ew qebûbû ewan qebîbûn. (F): bi qebe, bi qebin. |
| **Qebqeb** | (n.dar.mê) deng Dengê xwandina kewan. |
| **Qebqebkirin** | (k.jn.l.mê) bn :Qebîn. |
| **Qeçax** | (hk.x.çewa) bn : Qaçax. |
| **Qed** | (n.x.mê) Ta. Bejin. |
| **Qedare** | (n.dar.mê) Çendîya berhevkirî ko hindî pêdvî, hindî amanî.: Qedareyê bircê, du pedaxên avê di gel du yên bircê. |
| **Qedexe** | (hk.x.çewa) Nehêlana kirina karekî. Nabit .berbend. : Cigarekêşan qedexeye.: Çûne jûr qedexeye. |
| **Qedexebûn** | (k.jn.l.mê) Nehêlan. Berbendbûn. |
| **Qedexekirin** | (k.jn.l.mê) Berbendkirin. Nehêlan. Nehiştin. |

| | |
|---|---|
| **Qedir** | (n.x.nêr) Rêz. Rûmet. |
| **Qedirgiran** | (hk.l.çewa) Birêz. Rêzdar. Xwedî qedir. Bi rûmet. Hêja. : Mêvanên qedirgiran hûn gelek bi xêr hatin. |
| **Qedirgirtin** | (k.jn.l.mê) Rêzgirtin. Rûmetgirtin. : Camêrî gelek qedrê me girt dema em lê bûn mêvan. (K) bn : Girtin. |
| **Qedîfe** | (n.x.mê) Corekê perokane. |
| **Qefare 1** | (n.x.nêr) Qerome. |
| **Qefare 2** | (n.x.nêr) Kilîleka mezine ji darî ye jibo daxistina dergehan bi kar di hêt. Kîlûn. |
| **Qefarekirin** | (k.jn.l.mê) Daxistin. Kilîldan. (K) bn: kirin. |
| **Qefes** | (n.l.mê) Avayîyeke bi şivikên darî, asinî û yan kinifî bo parastina mitayî yan xwedîkirina gîyandaran, balindeyan. Rikeh. Qefesa : kewan, singî, amanan û htd. |
| **Qeft** | (n.x.mê) Destik. Gurz. Qefteka gulan ; destkekê gulan.: Qefteka gulan jibo hevala xwe kir diyarî. |
| **Qeftan** | (n.x.mê) Fîstan. Kiras.Xiftan. |
| **Qehreman** | (hk.x.çewa) Mêrxas. Mêrçak. Çavnetirs. Zîrek. |
| **Qehremanî** | (n.dar.mê) Zîrekî. Mêrxasî. |
| **Qehwayî** | (hk.dar.çewa) Rengekek taybete. Rengê qehwê. |
| **Qehwe** | (n.x.mê) Corekê vexwarina gerim yan sar e, reng qehwayîyek ser reşîve ye. |
| **Qehwevan** | (karn.dar.dz) Xwedî yan kesê qehweyê di de mêvan. Xudanê qehwexanê. |
| **Qehwexane** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê, xanîyê vexwarina qehwê. Çayxane. |
| **Qelaçokirin** | (k.jn.dar.mê) Jinav birin. Qelandin. |
| **Qelaçolan** | (hk.cih) Bajêreke li Kurdistanê, devera Silêmanî. |
| **Qelandin 1** | (k.jn.da.rmê) 1. Kelandina zadên wek hêk, goşt, giya û htd, di rûnî da, yan bi hişkî li ser agirî, wek nanî : Firavîna me evro goştê qelandî ye. (K) bdn: ez di qelînim em di qelînîn, tu di qelînî hûn di qelînin, ew di qelînit[..ne] ewan di qelînin. Pr: dêbi +bdn. bdb: di qeland, di qelandin. Db,dûr : qelandibû, … bûn. (F): bi qelîne, bi qelînin. |
| **Qelandin 2** | (k.jn.x.mê) Ji holê rakirin. Ji navbirin.: Dujmin dixwazin me bi qelînin. (K) bdn: ez di qelînim em di qelînîn, tu diqelînî hûn di qelînin, ew di qelînit[..ne] ewan di qelînin. Pr: dêbi +bdn. bdb: di qeland, di qelandin. Db,dûr : qelandibû, … bûn. (F): bi qelîne, bi qelînin. |
| **Qelebask** | (n.dar.mê) Qişqilank. |
| **Qelebelok** | (n.dar.mê) Qişqilank. |
| **Qelefil** | (n.x.mê) Corekê xizêmane, xire û wek gulane û bi birxûye jin dixin difina xwe. |
| **Qelem** | (n.x.nêr) Pênivîs. Xame. Kelem.: Qelemrisas, qelemê hişk Qelemhibir. Qelemê çavkildanê. Qelemreng. û htd. |
| **Qelemdank** | (n.dar.mê) Aman, yan tûrê têkirina qeleman. |
| **Qelemtiraş** | (n.l.nêr) Amêrê tîjkirina qeleman. |
| **Qelemzirêç** | (n.l.nêr) Qelemrisas. |
| **Qelen** | (n.x.nêr) Next. :Qelenê jinan girane. |

| | |
|---|---|
| **Qelereşk** | (n.lmê) tewal Teyreke(perinde) rengê wî reşe, nîşana têkdanê, durûyîyê ye. |
| **Qelew** | (hk.x.çewa) Pir goşt û bez. Mirovê qelew, candarê qelew; yê têr goşt û bez. Br× Lewaz. |
| **Qelewbûn** | (k.jn.l.mê) Dema mirov, candar qelew di be. Br×Lewazbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Qelewî** | (n.dar.mê) derd Kiryara zêdebûna goşt û berz an.: Qelewî ya wê gelek jê di hêt. Br×Lewazî. |
| **Qelewkirin** | (k.jn.l.mê) Candarê di hêt sexbêkirin da qelew bi bit.:Xwe bi zêde xwarin û vexwarinê qelew kir. (K) bn: Kirin. |
| **Qelihandin** | (k.jn.x.mê) Birandin. Qelandin. |
| **Qelizandin** | (k.jn.x.mê) Xwe vedizîn. (K) bdn: ez di qelizînim em di qelizînîn, tu di qelizînî hûn di qelizînin, ew di qelizîne[...it] ewan di qelizînin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : di qelizand, di qelizandin. Db,dûr: qelizandibû, qelizandibûn. (F): bi qelizîne, bi qelizînin. |
| **Qelizîn** | (k.jn.x.mê) Bi dizîve derbazbûn. Bi dizîve çûn. Pêdizkî birê kevtin.(K) bdn : ez di qelizim em di qelizîn, tu di qelizî hûn di qelizin, ew di qelize[...it] ewan di qelizin. Pr :dê bi+bdn. Bdb : ez di qelizîm, ew, hûn, ewan di qelizîn, tu, ew di qelizî. Db,dûr : ez qelizîbûm em qelizîbûyn, tu qelizîbûy hûn qelizîbûn, ew qelizîbû ewan qelizîbûn. (F) : bi qelize, bi qelizin. |
| **Qelî** | (n.x.mê) xwarin Pişkên goştê hûrkirî di gel rûn û bezî di mencelanda di qelînin, piştî sar di bit dixin cerikan û li zivistan û demên pêdvî di gel xwarinên din wek tirşik, îprax û htd bi kar dihînin. |
| **Qelîn** | (n.x.mê) bn :Qelûn. |
| **Qelîsêl** | (n.l.mê) xwarin Pişkên goştê liser sêlê di hêt birajtin. |
| **Qelîşivan** | (n.l.mê) xwarin Corekê qelîyê ye taybet jibo şivan di hat çêkirin. |
| **Qelp** | (n.x.nêr) Tîvkilê req. :Qelpê; darî, kezwan[keskan] ê,. Kelp. |
| **Qelpik** | (n.dar.nêr) Qelp. |
| **Qelqeloşk** | (hk.dar.çewa) Nanê li ser sêlê qelyayî, li dema xwarinê kirekir jê di hêt. |
| **Qelûn** | (n.x.mê) Corekê borîkane ji axa cerikan yan kanzayan hatî çêkirin, serekê mezin û serevraze,xir û valaye tûtinê di xin nav û pelekê liser di danin, yan agirî ber di dinê û serê din dixin di devê xweda di mêjin, mîna kêşana cigareyan. Sebîl.Qelîn. |
| **Qelyan** | (k.jn.x.mê) Xwarin, zadê hatî qelandin. :Ev nane gelek ya qelyaye. |
| **Qemandin** | (k.jn.l.mê) Dema tiştek bi hêt gerimkirin bêhin jê di hêt , lê nesojit.: Patek qemandî; nîvsotî.nanê qemandî. (K) bdn: ez di qemînim em di qemînîn, tu di qemînî hûn di qemînin, ew di qemîne[....it] ewan di qemînin. Pr: dê [bi] qemînim, qemînîn, qemînî, qemînin, qemînit[..ne], qemînin. Bdb: di qemand, diqemandin. .db,dûr: qemandibû,qemandibûn. (F): bi qemîne, bi qemînin. |
| **Qeme** | (n.x.nêr) Qame. |
| **Qemirandin** | (k.jn.x.mê) 1.Qemandin.2. Qerimandin. |
| **Qemî** | (pêrb.alv.girê) rêzman Ji pêxemet. Dako . jibo ko. Belkî. |
| **Qemsele** | (n.x.nê) Qapût. |

| | |
|---|---|
| **Qemyan** | (k.jn.x.mê) Dema tiştek di hêt qemandin. |
| **Qemyayî** | (hk.dar.çewa) Nîvsotî. Hatîye qemandin. : Ev pate yê qemyayî. |
| **Qenat** | (n.x.biyan.mê) Co. Kenal. |
| **Qenatê Kurdo** | (n.l.nêr) Rewşenbîrek û zimanvanekê kurdê Sovyetî ye. |
| **Qenc** | (hk.x.çewa) Baş. Çak. Hêja. Xweşmirov. Berkeftî. |
| **Qencî** | (n.dar.mê) Çakî. Başî. Pend :Qencî, nahêt li kurmancî. |
| **Qencîkirin** | (k.jn.l.mê) Başî, çakîkirin. Pend : Qencîyê bi ke û di ber avêda berde. (K) bn : Kirin. |
| **Qenctir** | (hn.dar.hevber) Çaktir. |
| **Qenctirîn** | (hn.dar.hevber) Çaktirîn. |
| **Qend** | (nx.mê) Şekirok. |
| **Qendav** | (n.I.mê) Ava gerim di gel şekirê bêyî ça. Şekirav. |
| **Qendîl 1** | (n.x.mê) Çira. |
| **Oendîl 2** | (hk.cih,cugir.n) Çiyayke li Kurdistanê- Iraq. |
| **Qenepe** | (n.x.nêr) Cihek wek taqikane ji depan hatîye çêkirin û bi îsfenc û perokan dpoşî ye, mirov jibo li ser rûniştinê bi kar di hînin. Dîwan. Kenepe. |
| **Qentere** | (n.x.mê) Rê yan solîna li bin; rê, pir, ber, gir, çiy an. Kenal. |
| **Qepan** | (n.xmê) I . Terezîya pîvana mitayî. |
| | 2. Cihê firotina mitayî bi kom. |
| **Qepat** | (hk.x. çewa) Dapoşî. Dergirtî. |
| **Qepatbûn** | (k.jn.I.mê) Hatin dergirtin. : Çavên wî qepat bûn. Ang; kevtin ser hev. |
| **Qepatkirin** | (k.jnlmê) girtin. Daxistin. (K) bn: Kirin. |
| **Qepax** | (n.x.mê) Derîk. Dergehk. Dervan. Derpoş. |
| **Qepşon** | (n.x.mê) Binê fîşekên tiveng debance û topan, yê derzî bi wê di kevit dema şeqandinê. |
| **Qeramk** | (n.x.mê) Derok. Dergehk. : Qeramkê avdankî. : Qeramkê çaydankî. |
| **Qerebalix** | (n.dar.mê) Dengûdor. |
| **Qerebalixkirin** | (k.jn.I.mê) Dengûdorkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Qerec** | (nejad.n.x.dz) Desteyeka mirovên gerok û xazokin. Delî. Qereçanî, |
| **qereçkanî** | (hk.dar.çewa) Bizar qereçan ve kirin. zaravê qereçan. |
| **Qerecox** | (hk.cih,cugir.n.biyan) Çiyayeke li Kurdistanê. |
| **Qeredax** | (hk.cih,cugir.biyan) Bajêrek Kurdistana Iraqê ye. |
| | 551 |
| **Qerefil** | (n.x.mê) Corek bazinên taybete jin di xin lingên xwe. |
| **Qerem** | (n.x.mê) Qamîş. |
| **Qerimîn** | (k.jn.x.mê) I. Qerisîn. Tezîbûn. |
| | 2. Mandîbûn.(K) bdn: ez di qerimim em di qerimîn, tu di qerimî hûn di qerimin, ew di qerime[. . .it] ewan di qerimin. Pr: dê bi + bdn. Bdb : di qerimî, di qerimîn. Db,dûe : qerimûbû, . . . bûn. (F) : bi qerime, bi qerimin. |
| **Qerisandin** | (k.jn.x.mê) I. Tezandin. Sarkirin. 2. Ji kar rawestandineka demkî. |
| **Qerişî** | (hk.dar.çewa) Qerisok. |

| | |
|---|---|
| **Qerişîn** | (k.jn.x.mê) Bestin. Tezîbûn. Sarbûn.: Ava qerisî. Ya btiye qerîse. : Mirov qerisî.. sar bûn. |
| **Qerisok** | (hk.dar.çewa) Mirovê herdema piçek seqa sarbti, ji serman di lerzit.Yê xwe di ber sirê na gire. |
| **Qerîşe** | (n.x.mê) Berif a req. Cemed. Qeş. |
| **Qerîsok** | (hk.dar.çewa) I . Dema qerîse erdî di girit. 2. Qerisok. |
| **Qerqode** | (n.dar.mê) Kelexê şelandî. Kelexê ptiçbtiyî. Kelexê bêgoşt. Qerqodeyê : tirombêlê, dewarên mirî. Mirovek qerqode ; mirovek lewaz û bêgoşt. Mirovek nîvmirî. |
| **Qerome** | (n.x.nêr) Darekê dusere, binê wî qayîm di erdî ra di ken, duserên din jibo emandina gopalan bi kar di hînin. Qefare. |
| **Qerqeşe** | ( n.dar.mê) l.Cirebir. Cire.2. Arêşe. |
| **Qerqeşekirin** | (k.jn.I.mê) I .Dengkirin. Dengûdorkirin. Cirekirin. 2. Arêşekirin. (K) bn: Kirin. |
| **Qert** | (hk.x.çewa) 1. Qonaxa dawîya jîyê nîrî. Nêrîyê qert. 2. Pîr. |
| **Qertejin** | (hk.I.çewa) Jina bi temen. Pîr. |
| **Qertemêr** | (hk.l.çewa) Zelamê navsalveçûyî. Pîr. |
| **Qesel** | (n.x.mê) Pîş û pelexê genim, ceh, nîsk û htd. Ka gir. |
| **Qesik** | (n.dar.mê) Madeyek wek tevinî ye kirimkê giyandarên biçtik Hrqonaxeka jîyanê da di nav da di mînin. : Qesika kirimê avirmîşî. |
| **Qesîl** | (hk.cih,n.x.mê) Cihê qeselê. Zevîya hatî dirûn û qesel lê mayî. |
| **Qesîlk** | (n.dar.mê) Davên hatîn dirûn. Qesela nav zevîyê ya hatî birîn. Zilik. |
| | 552 |
| **Qesp** | (n.x.mê) Fêqîyek şirîn bi tame, berê dara xurmeyê ye. Pend: Dîyarî qespe, ştindîyarî hespe. ;ang .kiryara baş bersiva wê herdem baştire. |
| **Qesrîli** | (n.I.mê) Tirarekê lûleyî ye di landikê da li bin zarokan di danin jibo desnivêja wan bi çit nav û xwe pîs nekin. Oestakirin (k.jn.I.mê) Livîn, bizivîn ber bi sentekê. : Min qesta ; mal, ser kari, def hevalekî û htd kir.(K) bn : Kirin. |
| **Qeşa** | (n.x.mê) Befîra req. Cemed. Qerise. |
| **Qeşabûn** | (k.jn.I.mê) Qerisîn. Av qeşa bû,ang; av cemidî. |
| **Qe]agirtin** | (k.jn.I.mê) Qeşabûn. Qerisîn. Cemidîn. |
| **Qeşakirin** | (k.jn.I.mê) Cemidandin. Qerisandin. |
| **Qeşavî** | (hk.dar.çewa) Leşê mirov, ji ber seraiayê nexasim lêv û dest rengê wan sipî di bin û di peqin[şeq di bin] mîna qeşayê. |
| **Qeşavîbûn** | (k.jn.I.mê) Weke devûlêvên mirovî qeşavî di bin. (K) bn : Btin. |
| **Qeşe** | (n.x.nê) Zanayê dînê mesîhîyan. Keşe. |
| **Qeşitandin** | (k.jn.x.mê) Weke mirov li êkî bi xurit bi ket der.Derêxistin. Bi qeşite. |
| **Qeşitîn** | (k.jn.x.mê) Bi serçmandî derkevtin.Bi serşorî ji holê derkevtin. |
| **Qeşmer** | (hn.x.çewa) dijûn Lewçe. Parav. |
| **Qeşvan** | (k.jn.x.mê) Qeşitîn. : Bi qeşye. |
| **Qetlazî** | (n.x.mê) Kêmasîya xwarinê. Giranînîya kelûpelan û tiştê xwarinê. |
| **Qetlazîbûn** | (k.jn.I.mê) bûn qetalzî Neman yan kêmbûna pertalên jiyanê. |

| | |
|---|---|
| **Oetlazîkirin** | (k.jn.I.mê) kirin qetlazî Di kawdanên nexweş û pevçûnan da,mirov di bin sedema qetazîyan. |
| **Qetran** | (n.x.mê) I .Rengek reşe mirov li pora xwe di din da reş bi bit.2. Qêr. |
| **Qewal** | (kam.dar) Dîndarekê dînê êzîdîyane. |
| **Qeware** | (n.x.mê) Qebare. |
| **Qewarok** | (n.dar.nêr) Amêrê qewartina bacan, kulind û htd. |
| | 553 |
| **Qewartin** | (k.jn.x.mê) Qewirandin. (K) bdn: ez di qewêrim em di qewêrîn, tu di qewêrî hûn di qewêrin, ew di qewêre[...it] ewan di qewêrin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : di qewart, di qewarin(tin). Db,dûr: qewartibû, qewaritibûn. (F): bi qewêre, bi qewêrin. |
| **Qewirandin** | (k.jn.mê) Jinav înane der. Bacan, bacanreş, kulind û htd bi qewarokî qewirandin navka wan jê înan der.(K) bdn: ez di qewirînim em di qewirînîn, tu di qewirînî hûn di qewirînin, ew di qewirîne[...it] ewan di qewirînin. Pr: dê[bi] qewirînim, qewirînîn, qewirînî, qewrînin, qewirînit[..ne], qewirînin.Bdb: di qewirand, di qewirandin. Db,dtir: qewirandibti, ... bûn. (F): bi qewirîne, bi qewirînin. |
| **Qewirîn** | (jn.x.mê) l.Jinav înaye der. Bacana qewirî.2. kêrikeka taybetî ye jibo qewirandina mitayê wek bacanreşk, xiyar kulind û htd bi kar di hêt. (K) bdn: ez di qewêrim em di qewêrîn, tu di qewêrî hûn di qewêrin, ew di qewêre[...it] ewan di qewêrin. qewartibti, qewaritibûn. (F): bi qewêre, bi qewêrin. |
| **Qewitandin** | (k.jn.mê) Derkirin. Derêxistin. |
| **Qewirîn** | (k.jn.x.mê) Derkevtin. Qeşyan. |
| **Qey** | (pêrb.alv. gir) rêzman Ma. : Qey tu yê koreyî tu min nabînî ?. |
| **Qeydî** | (pêrb) rêzman Gerek. Pêdvî. :qeydî nake, ne gereke, ne pêdvî ye. Çi qeydî ye. |
| **Qeyîm** | (hn.x.çewa)bn: Qayîm. |
| **Qeymax** | (n.l.nêr) sptyatt Sertîk. Nexasim sertîkê gamêşan. |
| **Qeynax** | (nl.mê) Amêrekê ji pirteka qayîş û şîşkeka asinê ser badayî,dema drûna dexlan cotyar dixin tiblên xwe jibo pitir qeselê di destê xweda bi girin û parastina destan ji stirî û qurinçkan. |
| **Qeyre** | (hk.x.çewa) Jiyê navîn yê keça bi temen û şti nekirî yan lawê bi temen û zigurd. |
| **Qeyrebûn** | (k.jn.I.mê) Navsalveçûna keç û xortan. (K) bn : Bûn. |
| **Qeyrejin** | (hk.l.çewa) Jina qeyre. |
| **Qeyremêr** | (hk.I.çewa) Mêrê qeyre. |
| **Qeyşî** | (n.x.mê) Mijmija hişikkirî. |
| **Qeytan** | (n.x.mê) Bendikek peyt, zirav û qayîme. Bendik. Dav. :Mêrê simbêl qeytan ; simbêlên wî di ziravin. |
| | 554 |
| **Qezme** | (n.x.nê) Amêrekê kolana erdî ye, du ser hehe yek tîj û yêdî pane, jibo rakirina erd cihên asê bi kar di hînin. |

| | |
|---|---|
| **Oêjandin** | (k.jn.dar.mê) Hewarkirin. Qêjîkirin (kirine qêjî). (K) bdn: ez di qêjînim em di qêjînîn, tu di qêjînî hûn di qêjînin, ew di qêjînit[..ne] ewan di qêjînin. Pr: dê[bi] qêjînim, qêjînîn, qêjînî, qêjînin, qêjîne[....it], qêjînin. Bdb: di qêjand, di qêjandin. Db,dtir: qêjandibti, ... btin. (F): bi qêjîne, bi qêjînin. |
| **Qêjî** | (n.x.mê) deng Ji tirs û sehiman da hewarkirin. Dengek bilind û bi sehim. Qîj.qîjên. |
| **Qêr** | (n.x.nêr) I .Keresteyekê reşe, jibo çêkirina şarê û kolanan bi kar di hêt. 2.Reş. |
| **Qêrê** | (hk.gaz.mê) Bang yan navkirina jina reş. |
| **Qêrî** | (n.x.mê) bn: Qêjî. : Eve çiye tu ho di kî qêrî?. î |
| **Qêro** | (hk.gaz.nêr) Navkirina mêrê reş. ' |
| **Qiceqic** | (n.dar.mê) deng Dengê sotina daran. Qiçqiç. Qirçeqirç.qirçên. |
| **Qicên** | (n.dar.mê) Qirçên. :Qiçên ji didanan hat. |
| **Qidîk** | (n.x.mê) Qidqidank. Gilîzank. |
| **Qidqid** | (n.l.mê) deng Dengê xwandina mirîşkan. |
| **Qidqidank** | (n.dar.gel) Hişa hind cihên nemaze yên leşê mirovî bi destvedanê ji alîyê yekê din ve kenî ya mirovî di hêt. Gilîzank. |
| **Qidqidankyebûn** | (k.jn.gl.mê) Hişkirin bi gilîzankan. : Destê xwe nêzî zikê min neke qidqidankêd miri ve di bin. |
| **Qidoidankvekirin** | (k.jn.gl.mê) Heger yek qidqidankêd mirovî ve bike. Gilîzankvekirin. : Qidqidankêd zarokî ji binê pêyan ve kirin. |
| **Qij** | (hk.x.çewa) Pora ne şekirî.pirça gijavij. Serê qij. Pora qij. Gij. |
| **Qijilandin** | (k.jn.x.mê) Kuzrandin. Qemandin. |
| | 555 |
| **Qilîç** | (n.x.mê) can Tibila biçûk ya dest yan pêyêd mirov û hind candaran. |
| **Qiloç** | (n.x.nêr) candar Qoç. Şax. |
| **Qim** | (n.x.mê) Qurç. Qurm. |
| **Qumdan** | (k.jn.l.mê) Qumlêdan. Qunnlêdan. Dema mirov fîrekê li ave, cigarê di de. |
| **Qimil** | (n.x.mê) camiar Qembelk. Corek kêzikane. |
| **Qimyan** | (k.jn.x.mê) bn : Qemyan. |
| **Qimyayî** | (hk.dar.çewa) bn : Qemyayî. |
| **Qinare** | (n.x.mê) Sêdare. |
| **Qinarekirin** | (k.jn.l.mê) Sêdaredan. Hilawîstin. |
| **Qinêt** | (n.x.nêr) Niviş. Berebab. Kûk. Qinyat. Tuxim. |
| **Qinyat** | (n.x.nêr) bn: Qinêt. |
| **Qir 1** | (hn.nx.mê) Ferman. Jinavbirin. Nehêlan. Çam. |
| **Qir 2** | (n.x.mê) balinde Qelereşk. Pend : Hevalê qirê nikil bi gwî[gû] ye.;ang: hevalinî a kesê xirab yê wek qirê, peşêmanî ye.3. Sir Seqem |
| **Qirandin** | (k.jn.dar.mê) Şikênan. Dengê qirçênê jê înan Ewî darek qirand. ,. . .pişta xwe qirand [veqirand] ;qirpên jê îna (K) bdn: ez di qirînim em di qirînîn, tu di qirînî hûn di qirînin, ew di qirîne[….it] ewan di qirînin.Pr: dê[bi] qirînim, qirînîn,qirînî, qirînin, qirînit[..ne], qirînin. Bdb: di qirand, diqirandin. Db,dû qirandibû,qirandibûn. (F): bi qirîne, bi qirînin. |

| | |
|---|---|
| **Qiraşe** | (n.x.nêr) Lîhaz. |
| **Qirç** | (n.x.mê) deng Dengê şikandina hesti, dar, asin û htd. |
| **Qirçandin** | (kjn.x.mê) Vekirin yan kêşana gehan ta deng [qirçên] je bi het. : Tiliyen xwe ne qirçîne, eger dê fêr bî.(K) bdn: ez di qirçinim em di qirçinin, tu di qirçînî hûn di qirçînin, ew di qirçine[....it] ewan di qirçînin. Pr : dê[bi] qirçînim, qirçînîn, qirçmi qirçinin, qirçinit[...ne], qirçînin. Bdb : di qirçûd, di qirçandin. Db,dur : qirçandibû,qirçandibim. (F): bi qirçînê bi qirçînin. |
| | 556 |
| **Qirceqirç** | (n.I.mê) Qirçqirç. |
| **Qirceqirckirin** | (k.jn.gl.mê) Qirçqirçkirin. |
| **Qircên** | (n.dar.mê) I .deng Dengê ji egera rakêşan yan vekirina gehên leşî.: Min tibila xwe kêşa qirçên jê hat.2. Dengê şikestinê. |
| **Qirçqirç** | (n.l.mê) bn: Qiçeqiç. |
| **Qircqirckirin** | (k.jn.gl.mê) Dengê qirçeqirçê kirin. |
| **Qirdêl** | (n.x.mê) Perçe lastîkeke ,mîna gulane keç pora xwe pê girê di din. |
| **Qirdon** | (n.x.mê) Corekê stovankane. Corek ristikane. |
| **Qirêj** | (n.x.mê) Gemar. Pîsî. |
| **Qirêjî** | (hk.dar.çewa ) Pîs. Gemar. : Tu çendê qirêjîyî, here serê xo bi şû! |
| **Qirêjîbûn** | (k.jn.I.mê) Pîsbtin. Gemarbûn. . :Leşê min jiber gerim a duh yê qirêjî bûy. (K) bn: Bûn |
| **Qirêjîkirin** | (k.jn.I.mê) Pîskirin. Gemarkirin. : Azadî cilkên xwe yên qirêjî kirîn.(K) bn: Kirin. |
| **Qirêjok** | (hk.dar.çewa) Qirêjî. Gemar. |
| **Qirik** | (n.I.mê) can Gerden. Hefik.: Ew qirika min ber na de.: ang: ji min ve nabe. |
| **Qirîsk** | (n.x.mê) bn: Çirîsk. |
| **Qirkirin** | (k.jn.I.mê) Qelandin. Jinavbirin. Nehêlan. Ji holê rakirin. (K) bn: Kirin. |
| **Qirnaqûz** | (n.dar.mê) bn: Darînqûz. |
| **Qirpên** | (n.dar.mê) bn: Qirçên. |
| **Qirpênhatin** | (k.jl.mê) Qirpên jê hatin 1. Dengê qirpênê. 2. Bûyerek nexweş û ji nişêve qirpên ji piştê hat. .: Dema min çavên wî dîtîn, qirpên ji pişta min hat., min zanî xwelî ya bi êkî werbûy!. |
| **Qirpênkirin** | (k.jn.gl.mê) Qirpênhatin. |
| **Qirpik** | (n.dar.mê) Birik. |
| **Qirpikhatin** | (k.jn.I.mê) Birik hatin mirovî. |
| **Qirpikhelatin** | (k.jn.I.mê) Qirpikhatin. |
| **Qirqir** | (ndar.mê) deng Dengek taybete, wek yê qelereşkê, derî û htd. |
| **Qirqirkirin** | (k.jn.gl.mê) Dengê qirqirê jê hatin. |
| **Qirş** | ( n.x.nêr) I.Dindikeka gilêşî. pirteka dar, ber, ax û htd. 2.Takên darên hişk. |
| **Qiryan** | (k.jn.x.mê) Şikestina daran jiber giranîya çeqan, bayî yan her hêzeka din. : Çeqên sêva me yên qiryayn hindî sêvên pêve hatîn. |
| **Qişqilank** | (n.x.mê) tewal Core balindeke, kilik dirêje, hêkker, rengê wê reş û sipîye, hêlîna xwe liser darên bilind di ket. Mamik :Ji qêrî reştire, ji befirê sipîtire, kurî ji bejin ê dirêjtire. |

| | |
|---|---|
| **Qişt** | (hn.x.çewa) Zîx. Peyt. Gişt. |
| **Qiştbûn** | (k.jn.l.mê) Zîxbûn. Peytbûn. |
| **Qiştî** | (n.dar.mê) Zîrekî. Peytî. |
| **Qiştkirin** | (k.jn.l.mê) Peytkirin. |
| **Qîç** | (hk.x.çewa) Bilind. Bel. Derkeftî. : Didanên wî di qîçin. |
| **Qîçbûn** | (k.jn.I.mê) Bilindbûn. Dîyarbûn. Xuyabtm. (K) bn: Bûn. |
| **Qîçkirin** | (k.jn.I.mê) Xuyakirin. : Didanên wî ji dûr ve qîç dikin. (K) bn: Kirin |
| **Qîjandin** | (k.jn.x.mê) Qêjandin. |
| **Qîjên** | (n.dar.mê) deng Qîjeqîj. Qarên. |
| **QîjeQîj** | (n.I.mê) Qîjên. |
| **QîjeQîjkirin** | (k.in.I.mê) Qêreqêrkirin. : Qîjeqîja balindey, çtiçikê.(K) bn: Kirin. |
| **Qîjîn** | (n.dar.mê) Qêjîn. |
| **Qîm** | (hk.x.çewa) Têr. Têrakirin. Pûte. :Qîma xwe pê na anî.ang; pûte pê ne kir. |
| **Qîme** | (hnx.mê) xwarin Goştê gelek hûrkirî. Goştê hêrayî. |
| **Qîmekirin** | (k.jnlmê) Goşt hûrkirin. Goş hêran.(K) bn: Kirin. |
| **Qîmpêhatin** | (k.jn.l.mê) 1. Têrakirin. Pê têrbûn. :Qîma min pê na hêt. 2. Pûte pê kirin. : Qîma xwe pê ne hîna.(K) bn : Hatin. |
| **Qîqiloqî** | (hk.dar.çewa) deng Selîqa dengê bangdana kiroskî. |
| **Qîrandin** | (k.jn.x.mê) Qîjandin. Qîrên jê berdan. Girandin. |
| **Qîrîn** | (k.jn.x.mê) Qêrîn. |
| **Qît** | (hk.x.çewa) Bilind. Berçav. Qîç. |
| **Qîtik** | (n.dar.mê) Girêk. Pirsik. : Qîtika darê;ang girêkên liser qurmê daran. |
| **Qîyar** | (n.x.mê) bn: Kîvar. |
| **Qîz** | (n.x.mê) Keç. Dot. Kîj. |
| **Qoç** | (n.x.mê) Lêdana serî ya hindek giyandaran; wek beran, nêrî û htd. Pend :Qoça kevirî; ang pêkola bê berhem û çi pêve nehatin. |
| **Qoçlêdan** | (k.jn.I.mê) Giyandarên bi serî (qoçan) di danin.(K) bn : Lê dan. |
| **Qodîk** | (n..mê) I .Amaneke jibo têkirina xwarinan bi kar di hêt. : qodîka : doşavê, xoşavê, temateyê û htd.2. bn : Xudîk. |
| **Qodîkkirin** | (k.jn.I.mê) Pirkirina qodîkan. Têkirina xwarinê. Dagirtina qodîkan.(K) bn : Kirin. |
| **Qol** | (n.x.nêr) Bir. Deste. |
| **Qolçî** | (kam.dar.dz) Zêrevanê daristanan. |
| **Qolinc** | (n.x.mê) derd I . Navmilên mirovî. 2. Core derdeke di kurdewarî da ko ji egera westanê masolkeyên mirovî kirj di bin û zik û pişt bi janan di kevin. |
| **Qonax 1** | (hk.dem.mê) Dem. Heyam .Rojev.: Qonaxa êkê ji ya avakirina xanîyê me bi domahî hat. |
| **Qonax 2** | (n.x.mê) Avahî. Xanî. Hewangeh. |
| **Qondere** | (n.x.mê) Pêlav. |
| **Qontax** | (n.dar.mê) Depê binê tivengê yê pane, mirov li dema teqandinê di êxit milê xwe dako ne livit. |
| **Qop** | (hk.x.çewa) Mirovê bi pêyekî yan bê pê. Mirovê pêbirî. |

| | |
|---|---|
| **Qopbûn** | (k.jn.I.mê) Ji destdana pêyên mirovî. |
| **Qopê** | (hk.hd,gaz.mê) Navkirin yan gazîkirina jina qop. |
| **Qopik** | (n.dar.nêr) Tiştê birî. Kurtkirî. Qopikê cigarê. |
| **Qopkirin** | (k.jn.I.mê) Birîn. Jê ve kirin.(K) bn : kirin. |
| **Qopo** | (hd,hk,çewa.nêr) navkirin yan gazîkirina zelamê qop. |
| **Qor** | (n.x.mê) bn: Qur.Kur. |
| **Qoreqor** | (n.I.mê) Qorên. |
| **Qorên** | (n.dar.mê) bn: Orên. |
| **Qorî** | (n.x.nêr) Amanek taybete ava çayê têda gerim di kin. Çaydank. |
| **Qosk** | (nx.mê) bn: Darlastîk. |
| **Qubandin** | (k.jn.dar.mê) Wekî mirov amanekî da girit û pîçek ji lêvên wî bilindtir bi be.ji pirkirinê pitir.: Sindoqê, gûnî bi qubîne. (K) bdn: ez di qubînim em di qubînîn, tu di qubînî htin di qubînin, ew di qubîne[. . ..it] ewan di qubînin.. Pr : dê[bi] qubînim, qubînîn, qubînî,qubînin, qubît[...ne], qubînin. Bdb : di quband, di qubandin. Db,dûr : qubandibti, qubandibûn. (F): bi qubîne, bi qubînin |
| **Qube** | (n.x.mê) Avayîyek şêwe nîv hêkî, yan nîv tepik[xir]e li ser cihên pîroz ava di kin jibo xemlandinê. Li mizgeft ti mezargehan, bi rengê kesik yan zer xemlandine. |
| **Qubçe** | (n.x..mê) bn : Qumçe. |
| **Qul** | (n.x.mê) Cihê hatî qewirandin.kun. Çal. Khor. : Darkokey bahîv kirin di qula darê da. |
| **Qulac** | (n.x.mê) Cihê bi nav ve çûyî. Paşî. :Qulaça jorê [mezelê]. Quncalk. BrxKujî. |
| **Qulipandin** | (kjn.x.mê) Mirov yan hêzek tiştekî wergerînit. : Mamê min tirombêla xwe qulipnd. (K) bdn : ez di qulipînim, em diqulipînîn, tu di qulipînî hûn di qulipînin,ew di qulipîne[. . . .it] ewan di quÛpînin..Pr : dê[bi] qulipînim, qulipînîn, qulipînî, qulipînin.qulipînit[...ne], qulipînin. Bdb : di qulipand, di qulipandin. Db,dûr : qulipandibû, qulipandibûn. (F) : bi qulipîne, bi qulipînin |
| **Qulipîn** | (k.jn.x.mê) Wergeryan. : pêyê min qulipî.ang : pêyê min wergerya.(K) bdn : ez di qulipim em di qulipîn, tu di qulipî htin di qulipin, ew di qulipe[ it] ewan di qulipin. Pr : dê[bi]qulipim, qulipîn, qulipî, qulipin, qulipit[...pe], qulipin. Bdb : ez di qulipîm,em di qulipîn, tu di qulipî, hûn di qulipîn, ew di qulipî, ewan di qulipîn. Db,dtir : ez qulipîbûm, qulipîbûy hûn qulipîbûn, ew qulipîbû, ewan qulipîbûn. (F) : biem qulipîbûyn, tu qulipe, bi qulipin. |
| **Qulîzên** | (n.dar.mê) zêmar Dema bûyerek bi tiris yan nexweş rû di dit, jin û zarok û mêr bi hevre di ken qêjî.hewar û gazî. Zêmar. : Dengê balefiran hat, qulîzên kete gundî. |
| **Qulkirin** | (kjn.I.mê) Kunkiirn. Çalkirin. Çal tê vekirin. Qewirandin. (K) bn : Kirin. |
| **Qulp** | (n.x.mê) Girê. Hevalbendî. Hevpeymanî. Hevgirtin. |
| **Qulpik** | (n.dar.mê) Qumçe. Meyîk. |
| **Qum** | (n.x.mê) Qurç. Qurm. : Qumek li cigarê da. |
| **Qumandar** | (kar.n.dar.dz) Serleşker. |

| | |
|---|---|
| **Qumaş** | (nx.nêr) Perok. |
| **Qumatk** | (n.x.mê) Pateke di zarokên sava dipêçin. Pêçe. |
| **Qumçe** | (n.dar.mê) Corekê meyîkane, du pirtin di kevin nav yek. Qumçik.qubçe. |
| **Qumrî** | (n.x.mê) 1 . perinde Corekê teyrên mezin û gerûke. 2. Navê jinane. |
| **Quncal** | (n.I.mê) Qulaç. |
| **Quncik** | (n.dar.mê) Kunc. |
| **Qunêrî** | (n.dar.mê) Kulikên bi janin li leşê mirovî peyda di bin. |
| **Quntar** | (hk.cih) Betena çiya. Beten. Jêhelî. |
| **Qur** | (nx.mê) Kur. Teqin. |
| **Qurad** | (n.x.mê) giya Giyayekê dême, bi serik û kûvîye, bistîkên wî wêk yên sîrê ne, tama wî tije jibo xwarinê bi kar di hînin di Kin nav sawikan. |
| **Quraftin** | (k.jn.x.mê) Tirî çinîn. Çinîna tirî. Di qurêfim, bi qurêfe, di quraft. |
| **Qur an** | (n.biyan) Kitêba pîroza dînê îslamê. |
| **Qurandin** | (k.jn.x.mê) deng Qorên kirin. |
| **Qurav** | (n.I.mê) Kura bi av. teqina rûn. |
| **Qurban** | (n. x. nêr) 1 . Peyveke jibo rêzgirtina mirovên mezin bi kar Di hêt. Gorî. 2 Serê giyandaran di ken qurban li cejna qurbanê. Gorî. Ser. |
| **Qurbandan** | (k.jn.I.mê) 1. Xwe gorîkirin. 2. Serê kewalan kirin xêr(K) bn: Dan. |
| **Qurbankirin** | (k.jn.l.mê) Gorîkirin. : Şehîdan canên xwe kirin qurbanî xaka Kurdistanê. |
| **Qurbeşk** | (n.l.dz) candar Core giyandarekê kûvî, şîrdere. |
| **Qurç** | (n.x.mê) Fireka avê yan terayîya devî ko mirov bi êk car da di hîrit. Qurçeka avê. |
| **Qurçandin** | (k.jn.x.mê) Dahîran. Qurçdahîran. (K)bdn: ez di qurçînim em di qurçînîn, tu di qurçînî hûn di qurçînin, ew di qurçîne[...it] ewan di qurçînin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : di qurçand, di qurçandin. Db,dûr :qurçandibû, qurçandibûn.(F) : bi qurçîne, bi qurçînin. |
| **Qurçdahîran** | (k.jn.I.mê) Dema mirov qurçekê da di hîre.(K) bn : Dahîran. |
| **Qurçlêdan** | (k.jn.I.mê) Firek lêdan. Ek fir dahîran. : Qurçek li perdaxa avê da. (K) bn: Lêdan. |
| **Qurçifandin** | (k.jn.dar.mê) Serfirandin. Pilîtkirin. Birîn. :Tu di bînî Şêrkoy pişkovkên van gulan hemû yên qurçifandîn ?. |
| | Qurtifandin.(K) Bdn : ez di qurçifînim em di qurçifînîn, tu di qurçifînî hûn di qurçifînin, ew di qurçfîne[ …it] ewan di qurçifînin. Pr : dê[bi] qurçifînim, qurçifînîn, qurçifînî, qurçifînin,qurçifînit[...ne], qurçifînin. Bdb : di qurçifand, di qurçifandin. Db,dûr : qurçifandibû,qurçifandibûn.(F) : bi qurçifîne, bi qurçifînin. |
| **Qureder** | (n.dar.mê) dijûn Corek civîndanê ye. Corek nifrînane. |
| **Qurfik** | (n.dar.mê) Selik. |
| **Qurîn** | (k.jn.x.mê) Dengê qorênê beqan. Pend : Heger beq ne qurit, dê bi dirit. |
| **Qurm 1** | l(n.x.dz) 1. Qeda stûr ya darê. Korvilkên birî jibo sotinê.Korvilk. 2. Corekê çekê nêçîrane. Cifte. |
| **Qurm 2** | (n.x.mê) Çendeka dûkêla cigarê ya carekê. Hilmeka cigarê. |
| **Qurmên** | (n.dar.mê) deng Dengê tiveng û qurman. Gurmên. |

| | |
|---|---|
| **Qurmênhatin** | (k.jn.l.mê) Dengê qurmênê ji tivengê di hêt. (K) bn : hatin. Gurmênjêhatin. |
| **Qurmiçandin** | (k.jnlmê) dema mirov kaxezekê, gulekê, cilkekî destve di dit ta şêweyê wê têk bi çit yan bi gihorit, kirêt bi bit.(K) bdn: ez di qurmiçînim em di qurmiçînîn, tu di qurmiçînî hûn di qurmiçînin, ew di qurmiçîne[. . .it] ewan di qurmiçînin..Pr : dê[bi] qurmiçînim, qurmiçînîn, qurmiçînî, qurmiçînin, qurmiçînit[...ne], qurmiçînin. bdb: di qurmiçand, dqurmiçandin. Db,dûr: qurmiçandibû, .... bûn.(F): bi qurmiçîne, bi qurmiçînin. |
| **Qurmiçî** | (hk.x.çewa) Têkçûyî. Hatî qurmiçandin. Lewaz. :Mirovê qurmiçî :Rûçikê qurmiçî. Sêva qurmiçî. |
| **Qurmiçîn** | (k.jn.x.mê) Tiştê têkçûyî, mirovê leşê çerimê wî têkçûyî.: kurê te çendê qurmiçî ye?(K) Bdn: ez di qurmiçim em di qurmiçîn, tu di qurmiçî hûn di qurmiçin, ew di qurmiçe[...it] ewan di qurmiçin. Pr: Dê[bi] qurmiçim, qurmiçîn, qurmiçî, qurmiçin, qurmiçe, qurmiçin. Bdb: ez di qurmiçîm em di qurmiçîn, tu di qurmiçî.hûn, ewan di qurmiçîn, ew di qurmiçî. Db,dûr: ez qurmiçîbûm, em qurmiçîbûyn, hûn, ewan qurmiçîbûn, eww qurmiçîbû. (F): bi qurmiçe, bi qurmiçin. |
| **Qurmlêdan** | (k.jn.l.mê) I .Dema mirov dûkêla cigarê qurm qurm di kêşit û ber di dit. (K) bn: Lêdan. 2. Teqandin, lêdana qurmê[cifte]. |
| **Qurnet** | (n.x.mê) Kunçik. Qulaç. Kujî  yê ji nav da.Br x Kujî [sî]. |
| **Qurt** | (n.x.nêr) perinde Coreke ji teyrên kelexan. |
| **Qurtal** | (hn.x.çewa) Rizgar. |
| **Qurtalbûn** | (k.jn.I.mê) Rizgarbûn. :Ez li tu deran ji ber te qurtal nabim!. (K) bn: Bûn. |
| **Qurtalkirin** | (kin.I.mê) Rizgarkirin. :Tu dê çewan xwe ji destên qurtal bi kî!. (K) bn: Kirin. |
| **Qurtifandin** | (k.jn.x.mê) bn: Qurçifandin. |
| **Qurtifîn** | (k.jnxmê) bn: Qurçifîn. |
| **Qusandin** | (k.jdar.mê.biyan) Birîn. Tiraşîn. Jêkirin. |
| **Quşxank** | (n.dar.mê) Qazan. |
| **Qut** | (hk.x.çewa) Kurt. Kin. Birî. |
| **Qutabî** | (n.dar.dz) Xwendekar. Xwîndkar. |
| **Qutabxane** | (.dar.mê) Xwandingeh. Dibistan |
| **Qutan** | (k.jn.x.mê) Lêdan. Lêxistin. .(K) bdn : ez di qutim em di qutîn, tu di qutî hûn di qutin, ew di qute[. . .it] ewan di qutin.(. Pr Dê[bi] qutim, qutîn, qutî, qutin, qutit[...te], qutin. bdb : di quta, di qutan. Db,dûr :qutabû, qutabûn. (F) : bi qute, bi qutin |
| **Qutas** | (n.dar.nêr) Navekê kevinê kurdî ye. |
| **Qutbûn** | (k.jn.l.mê) Birîn. Bizdîyan. Piçan.(K) bn : Biin. |
| **Qutên** | (n.dar.mê) deng Dengê lêdana dilî. |
| **Qutkirin** | (k.jn.I.mê) Birîn. Kurtkirin. (K) bn : Kirin. |
| **Qutqut** | (n.I.mê) Qutêna dilî.: Qutquta dilê min bû ji tirsan da. |
| **Quz** | (n.x.mê) can Endamê guhnelî û mîztinê yê jinan yan giyandarên mê. Koş.Gulînk. |

| | |
|---|---|
| **Qûn** | (n.x.mê) I . Kuna paşîya mirov û giyandaran. Kon. 2. Alîyê piştê. :qonbeş, qonfireh ; kulekfireh ; tisonek.qoncihork, yê qonên wî wek cihoran.qonmezin, qonpan, qonxar. |
| **Qûndere** | (n.I.mê) Pêlava qayîşî. |
| **Qûrîn** | (n.x.mê) Qorîna ga û çêlan. |

# R

| | |
|---|---|
| **R** | (re) Pîta 21 ê ji abeya kurdî. |
| **Ra** | (hk.cih,n.x.mê) Rê. |
| **Raber** | (kar.n.dar.dz) Rêber. |
| **Raberî** | (n.dar.mê) Rêberî. |
| **Raberîkirin** | (k.jn.I.mê) Rêberîkirin. |
| **Raborî** | (hk.dem) Dema borî. Çûyî. Karê hatî kirin û derbazabûyî. |
| **Rabûn** | (k.jn.dar.mê) 1 .Dema mirov yan tişt bilind di bit, radi westit. :Ew rabû û qesta derî kir.: Dapîra min hind a pîre, nikarit rabit. 2. Bilindbûna bihayê pertalan. : bihayê Dînarê yê rabûy. Br x Rûniştin. (**K**) bn: Bûn. |
| **Raçandin** | (k.jndar.mê) Tiştekî bi çirî, bi tov belav bi kin. Çandineka bi tov. : :Erd bi mînan hatîye raçandin. |
| **Raçandî** | (hk.çewa) Hatîye raçandin. :Tevinê raçandî.(**K**) bn: Çandin. |
| **Raçav** | (hk.dar.çewa) Hicmeti. Çavzil. |
| **Raçavbûn** | (k.jn.I.mê) Hicmetîbûn. Hêbetîbûn. |
| **Raçavkirin** | (k.jn.I.mê) Dema gotineka seyr di hên kirin , mirov bi çavan bawer neket. Hicmetîbûn. |
| **Raçît** | (n.dar.mê) Kaxezek nivêsî jibo şirovekirin yan pirkirina zanînan. Girovename. |
| **Radan** | (k.jn.x.mê) Malîna, paqijkirina birkek avê, kanîyek avê, govekê û htd. Paqijkirin. Kanîya gundî radan. :Gova pezî dê rade. (**K**) bn: Dan. |
| **Radar** | (n.biyn.mê) Amêrek kompiyoterî ye jibo aşkerakirina her livînekê yan nişaneka dujminî, herwesa karûbarên zanînî. |
| **Rader** | (n.dar.nêr) **rêzman** Jêder. |
| **Radest** | (hk.dar.çewa) Di destan da. |
| **Radestbûn** | (k.jn.gl.mê) Kevtin destan. |
| **Radestkirin** | (k.jn.gl.mê) Xwe dane dest.: Evro çend serbazên dujminî xwe radestî pêşmergeyan kirin. (**K**) bn: Kirin. |
| **Radyo** | (n.biyan.mê) Amêrê guhdarîkirina dengan. îzgehê gehandina dengî. Pêlweş. |
| **Ragehandin** | (k.jn.dar.mê) Gehadina nûçeyan bi rêya rojname, radyo, TV û htd. |
| **Rageş** | (hk.dar.çewa) Mirovê arêşeyên demarî hene. Yê zû hêris di bit û nikarit xwe ragirit. |
| **Rageşî** | (n.dar.mê) **derd** Derdê toşî demarên mirovî di bit. Demartundî. |
| **Ragirtin** | (k.jn.dar.mê) I. Hilgirtin. Rakirin. Liser destan bilindkiirm. 2. Xwedîkirin. Bêhinfirehbûn. : Divê em hember dujminî xwe ragirîn. (**K**) bn: Girtin. |
| **Raguhaztin** | (k.jn.dar.mê) Ji ser cih û warî rakirin veguhaztin jibo cihek din . :Rijêma jinavçûyî kurd di raguhaztin jêrîya îraqê. (**K**) bn: Guhaztin. |

| | |
|---|---|
| **Rahatin** | (k.jn.dar.mê) Mirov xwe digel kawdan, bîyavekî bi guncînit. Hînbûn. :Em hêjta jibo jiyana derve ne rahatîne. (**K**) bn: Hatin. |
| **Rahavêtin** | (k.jn.dar.mê) Pêkolkirina giyandaran ko xwe ji destê mirovî bi derêxin. Bizava revînê. Bizava bazdanê. (**K**) bn: Havêtin. |
| **Rahejandin** | (k.jn.dar.mê) Tiştek bi hêz bi hejînit, bêkuta bi hejînit, ji kerb bi hejînit.veleqandin. Vehejandin. Vezirziqandin. :Milî wî rahejand û gotê ma qey tuyê koreyî tu min na bînî?.(**K**) bn: Hejandin. |
| **Rahêlan** | (k.jn.dar.mê) Kevtin dû. Kevtin dwîv. Bi dwîv ketin.: Segî rahêlayê û ewî bazda.[revî]. (K) bn: Hêlan. |
| **Rahênan** | (k.jn.Idar.mê) Fêrkirin. Hînbûn. :Rahênanên serbazî. |
| **Rahiştin** | (k.jndarmê) Mirov xwe bi çemînit[bi tewîne] jibo rakirina tiştekî. Balekirinê.bezînê. :Ez rahiştim şekalê û min li lingê xwe kir. Wê rahişt darekî û ji erdê rakir. |
| **Rajêr** | (hk.cih) Jêr. Bin. |
| **Rajor** | (hk.cih) Jor. Ser. |
| **Rakevtin** | (k.jn.da.rmê) Razan . Xwe dirêjkirin. Nivistin. Xwekirin. :Ez dê bêhinkê rakevim xwe min a di hêt. (**K**) bn: Kevtin. |
| **Rakêşan** | (k.jn.dar.mê) Girtin û kêşana tiştî jibo alîyê xweve anîn.: Babê guhê pisê xwe rakêşa; ang, girt û kêşa. (**K**) bn: Kêşan. |
| **Rakirin** | (k.jn.dar.mê) Bilindkirin. Hilgirtin. : Ber ji erdî rakir. :Sêv ji bin darsêvê ragirin. (**K**) bn: Kirin. |
| **Raman** | (n.dar.mê) Têgehiştina kar, kiryar, gotin û htd. Ango. Şirovekirin. Mebest. Hizir. |
| **Ramedan** | (k.jn.dar.mê) Razan. Rakevtin. |
| **Ramûsan** | (n.x.mê) Maç. Maçkirin. |
| **Ramûsandin** | (k.jn.x.mê) Maçkirin. Maçîkirin. |
| **Ramûsîn** | (k.jn.x.mê) Maçkirin. (**K**) bdn: ez di ramûsim em di ramûsîn, tu di ramûsî hûn di ramûsin, ew di ramûse[...it] ewan di ramûsin. Pr:dê[bi] ramûsim, ramûsîn, ramûse, ramûsî, ramûsin.Bdb: di ramûsa, di ramûsan. Db,dûr: ramûsabû, ramûsabûn. (**F**): bi ramûse, bi ramûsin. |
| **Ramyarî** | (n.dar.mê) Siyaset. |
| **Ran** | (n.x.nê) **can** Pişka serî û stûr ya lingî. Ji çûkî tanî kemaxê. |
| **Ranan** | (k.jn.dar.mê) Li ser dîwarî zêdekirin.Dîwar bilindkirin. Bankirina xanî. Axkirine serbanî. Avkirineve. |
| **Ranerim** | (hk.I.çewa) Nerimrê. :Mirovek, parteka ranerim. |
| **Ranik** | (n.dar.nêr) **can** 1. Ranê biçûk.2. Ranên çûçikan, mirîşkan. |
| **Raperîn** | (k.jn.dar.mê) Serhildan. Serîhildan. |
| **Rapêçan** | (k.jn.dar.mê) Pêçan. Werpêçan. Kirin Balolik Komkirin û hajotin nav cihekî. (**K**) bn: Pêçan. |
| **Rapêçkirin** | (k.jn.gl.mê) Wekî mirov tiştekî yan bireka mirovan paldet serêk û derêxit ber bi sentekê ve bi bit wek gilolikê têkwer bi bin, wek pêçanê lê bi hêt. (**K**) bn : Kirin. |
| **Rapor** | (n.cîh.mê) Nivîsîn û şirovekirina kiryar û bûyeran. |

| | |
|---|---|
| **Raport** | (nbiyan.mê) bn :Rapor. |
| **Raserîn** | (hk.dar.çewa) Dilpakî. Dilsojî. |
| **Rasine** | (n.x.nêr) Werîs. Kinif. |
| **Rast** | (hk.x.çewa) 1 . Tiştê rast; tiştê ne xar .Bê pêç. Bê çep. : Rêya rast,darê rast, bê çep.2. dirist. Ne saş . Ne direw. Gotina rast. Peyva rast. Peyama rast. |
| **Rastandin** | (k.jn.x.mê) Raskirin. Rasvekirin. : Mamosta nivîsîna qutabî di rastîne. (**K**) bdn : ez di rastînim em di rastînîn, tu di rastînî hûn di rastînin, ew di rastîne[...it] ewan di rastînin. Pr : dê[bi] rastînim,rastîne, rastînit, rastînim, |
| **Rastbêj** | (hk.I.çewa) Kesê ko direwan na kit. Viran nake. Rastgo.Dilpak. |
| **Rastbêjî** | (n.I.mê) Rastgoyî.Dilpakî. |
| **Rastdilî** | (n.l.mê) Dilsaxî. Rastgoyî. |
| **Rastdîtin** | (k.jn.I.mê) Mirov karekî yan gotinekê dirist bi bîne. Baş bi bînit. : Biryara tedaye, tu bi biçî derve jibo xandinê, ez rast di bînim. |
| **Raste** | (n.dar.nêr) Parçe darek yan naylonek nexşandî û hijmarkirîye jibo kêşana xîçan li ser kaxezan û tiştên din bi kar di hêt. Rastek. |
| **Rastehez** | (hk.I.çewa) Mirovê rasbîn. Mirovê dûrbîn. |
| **Rastek** | (n.dar.nêr) Raste. |
| **Rasterê** | (hk.I.çewa) Rêya rast, karê dirist. |
| **Rasterêbûn** | (k.hn.gl.mê) Kevtin ser rêya rast, dirist. (**K**) bn :Bûn. |
| **Rasterêkirin** | (k.jn.I.mê) Rêya rast nîşadan. Serrêkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Rastgo** | (hk.I.çewa) bn: Rastbêj. :Nirovê rastgo ewe yê direwan neke. Br x Vireker. Direwîn. |
| **Rastgoyî** | (n.I.mê) Dilsaxî. Rastbêjî. |
| **Rasthatin** | (k.jn.I.mê) Hevdîtin. Çavpêkevtin. |
| **Rastî** | (n.dar.mê) Gotina rast. Peyva rast. Karê dirist. **Pend** :Rastî di kulavxarin. Ang: xelk hez ji rastîyê û rexneyê nakin. |
| **Rastkirin** | (k.jn.I.mê) 1. Tiştê xar wek bizmar, dar, rast kirin. Peytkirin.2. Mirov rastkirin, mirov înane ser rêya rast. Berê wî dane rêya rast û dirist. Hişyarkirin. :Xwe rast ke, da xudê te bi ser bêxt. (**K**) bn: Kirin. |
| **Rastkirî** | (hk.I.çewa) 1. Peytkirî. Hatîye rastkirin. 2. Kevtine ser rêya dirist. |
| **Rastnivêsan** | (k.jn.I.mê) Çewayî ya fêrbûna dirist nivêsînê. Vehecandin. |
| **Rateqan** | (k.jn.dar.mê) Revîn. Teqyan. |
| **Rateqandin** | (k.jn.dar.mê) Bi darê zorê derêxistn. Rahêlanê. : Pêşmergehan dujmin ji gundî rateqandin. (**K**) bn: Teqandin. |
| **Ratib** | (n.x.mê) Parê heyvane yê hember karkirinê. Mehyane. |
| **Rav 1** | (n.x.mê) Nêçîr. |
| **Rav 2** | (n.x.mê) **derd** 1 .Pinîyên rengîn, li giyanê mirovî di hên, nemaze rûyan.2. Şerim. 3. Rêv. |
| **Raye** | (n.x.mê) Şirove. |
| **Ravek** | (n.dar.mê) Parçeka nivîsanê yan filmî. |

| | |
|---|---|
| **Ravekew** | (n.I.mê) Nêçîra kewan. |
| **Ravekirin** | (k.jnlmê) Şirovekirin. :Heger tu bi karî ji me ra vê gotarê rave bi kî, em dê minêkar bîn.(**K**) bn: Kirin. |
| **Ravevan** | (karn.dar.dz) Kesê karê wî ravekirin e. |
| **Ravker** | (kam.dar.dn) Nêçîrvan. |
| **Ravêj** | (n.x.mê) Hizir. Raman. Nijinîn. |
| **Ravêjkar** | (kam.dar.dz) Şîretvan. |
| **Ravêjvan** | (karn.dar.dz) Ravêjkar. |
| **Raweradin** | (k.jn.dar.mê) Kutekî lê kirin ta xwe bi tewîne, lava bi ke. Zorî lêkirin ta xwe bi şikênit. |
| **Rawest** | (n.dar.mê) **rêzman** Rawestan li xalekê. Navbir. |
| **Rawestan** | (k.jn.dar.mê) Ji cihê xwe ne livîn. Ne bizivîn. (**K**) Bdn: ez iradwestim em radiwestîn, tu radiwestî hûn radiwestin, ew radiwete[...it] ewan radiwestin. Pr: Dê ra[bi] westim, rawestîn, rawestî, rawestin, rawestit[...te], rawestin. bdb: di[radiwestam,radiwestan, radiwetay, radiwestan, radiwesta, radiwestan]. Db,dû: rawestabû, ... bûm, bûy, bûyn.bûn. (**F**): bi raweste, bi rawestin. Rabiweste, rabiwestin. |
| **Rawestandin** | (k.jn.dar.mê) Ragirtin. Ne hêlan bi bizivin. : Lawo; here teksîyekê rawestîne, da siyar bîn ti bi çîn seredana mamê te. |
| **Rawestek** | (n.dar.nêr) Amêrê pê rawestandina makîna. : Rawestekê tirombê. Rawestekê paysiklê. Stop. |
| **Raxirandin** | (k.jn.dar.mê) Rakêşaneka bi hêz ko dengê xirênê jê bi hêt. Rakêşan. (**K**) bn: Xirandin. |
| **Raxistin** | (k.jn.dar.mê) Danana nivînan liser erd û textan di danin. Mal raxistin ; merş, berik, mehfîr lê danan. (**K**) bn: Êxistin. |
| **Raxistî** | (hk.dar.çewa) Mal yan cihê serûberkirî. Hatî raxistin. : Mala wan her dem ya raxistî ye. |
| **Raxît** | (n.x.nêr) **candar** Adî. |
| **Raz** | (n.x.mê) Nihênî. Nepenî.: Ez nizanim raza te çiye tu hosa yê damayî?.ang; tiştek veşarî di nava te da heye. |
| **Razan** | (k.jn.dar.mê) Rakevtin. Xwe dirêjkirin. Xewkirin. Nivistin. (**K**) Bdn: ez di razim em di razîn, tu di razî hûn di razin, ew di raze[...it]ewan di razin. Pr Dê[bi] razim, razîn, razî, razin, razit[...ze], razin[razên]. Bdb: di razam, di razayn, di razay, di raza, di razan. Db,dûr : razabûm, ..bû, bûn, bûy. radiza,radizan. (**F**): bi raze[razê], bi razin[razên]. |
| **Razandin 1** | (k.jn.mê) Nivandin. Dirêjkirin. : Daykê zarokê xwe razand.(**K**)bdn: ez di razînim em di razînîn, tu di razînî hûn di razînin, ew di razîne[...it] ewan di razînin. Pr:dê[bi] razînim, razînîn, razînî, razînin,razîne. Bdb: di razand, di razandin. Db,dûr: razandibû, razandibûn. (**F**): bi razîne, bi razînin. |
| **Razandin 2** | (k.jn.I.mê) Xemilandin.Ciwankirin. : Me bajê xo yê razandî jiber cejina Newrozê. .(**K**)bdn: ez di razînim em di razînîn, tu di razînî hûn di razînin, ew di razîne[...it] ewan di razînin. Pr:dê[bi] razînim, |

| | |
|---|---|
| | razînîn, razînî, razînin,razîne. Bdb: di razand, di razandin. Db,dûr: razandibû, razandibûn. (**F**): bi razîne, bi razînin. |
| **Razanxane** | (n.dar.mê) Cihê razanê. Jora razanê. Jora nivistinê. |
| **Razayî** | (hk.dar.çewa) Mirov, candarê razayî. Ang ; mirovê nivistî. Nivistî. Di xew. Rakevtî. Dirêjkirî. |
| **Reben** | (hk.x.çewa) 1 . Texeka oldarên mesîhîyan [felan]ne.2 . Bê deshelat. Jar.3. Bend. Dîl. Girtî. |
| **Rebeq** | (hk.x.çewa) Bi hevre. Pêkve. Liser êk. : Deh salên rebeqin ew ji gundê xo dûr kevtîye. |
| **Reçel** | (n.x.mê) xwarin Xwarineka şirîne ji fêqî hatîye çêkirin. Mirebe. Reçela xoxan, zerdilan, sêvan û htd. |
| **Ref 1** | (n.x.mê) Depeke bi dîwarê navmalê ve qayîm di ken, kitêb û pertalan li ser di danin. |
| **Ref 2** | (n.x.mê) Birên teyran [balindeyan] . Refa kewan, sîskan, Kutiran û htd. Pend: Her teyr û refa xwe. ang: mirov digel kes û hevalên xwe. |
| **Refank** | (n.dar.mê) Refa dîwarî. |
| **Reg** | (n.X.mê) darûbar Rih. |
| **Regez** | (n.x.nêr) Nivş. Tuxim. Nejad. |
| **Regezperist** | (hk.I.çewa) Nivşperist. Nejadperês. |
| **Reha** | (hk.x.çewa) Tiştê ko bêgoman dê rû bi de. |
| **Rehwan** | (hk.dar.çewa) Şareza. Hînbûyî. Fêrbûyî. Bisteh.: Hespê reliwan. Beza. Bezek. |
| **Rehwanî** | (n.dar.mê) Şarezayî. Bistehî. |
| **Rejgeh** | (gk.cih,n.dar.mê) Sîlav. Sîl. : Rejgeha gelîyê Elîbegê. :Rejgeha gelîyê Duhok. |
| **Rejî** | (n.x.mê) Pirtên darî yên nîvsotî û reng reşin,jibo gerimê û karên lênanê bi kar di hên. Pelên hatîne vemirandin berî hemû bi sojin. Rejû. |
| **Rejîber** | (n.l.mê) Berqêr. |
| **Rejû** | (n.x.mê) bn: Rejî. |
| **Remedan** | (n.biyan) Remezan. |
| **Remezan** | (nx.biyan.mê) Meha rojîgirtinê li cem olan, xasim Islamê. |
| **Remil** | (n.x.mê) Xîz. Teqin. Kur. |
| **Renc** | (n.x.mê) Mandîbiin .Zehmet. |
| **Rencan** | (k.jn.x.mê) Torebiin. Hêrisbûn. |
| **Rencber** | (kam.dar.dz) Rêncber. |
| **Rencîn** | (hk.dar.çewa) Mirovê mandî. Mirovê westayî. Renckêş. |
| **Renckêş** | (kam.l.dn) Zehmetkêş. Rencîn. |
| **Rende** | (n.x.mê) Kartîk. |
| **Rendek** | (n.x.mê) Tax. Gerek. |

| | |
|---|---|
| **Reng** | (n.x.mê) 1 . Sor, zer, pîvazî, kesk, şîn, esmanî, mor, hinarî, pirteqalî, yan hind reng têkel rengin. : Kesk, sipî,sor û zer rengên ala ya kurdistanê ne. 2. Awa. Cor. Bi vî rengî ; bi vî awayî. |
| **Rengavêtin** | (k.jn.I.mê) Rengdan. |
| **Rengbûn** | (k.jn.I.mê) Tiştê rengekî wer di girit. : Kirasê wî yê reng bûy. |
| **Rengdan** | (k.jn.I.mê) 1.Cilikên bi şûştinê reng jê der di keve û di de cilikên dî. : Sakoyê min li ber baranê rengê xwe di dit û çipikên ava sor jê di kevin. 2. Dengvedan. Navdeng kevtin. |
| **Rendgder** | (hk.dar.çewa) Tiştê rengî di det. BrxRenggir. |
| **Rengdêr** | (n.dar.mê) rêzman Hevalnav. |
| **Rengîn** | (hn,hk.dar.çewa) Hemereng. Pineng. Gelek reng bi hev ra. : Televizyûna rengîn. |
| **Rengkirin** | (k.jn.I.mê) Wekî mirov rengekî li cihekî yan tişkekî bi ke. Sorkirin, zerkirin, Morkirin û htd. :Me dîwarê xanî reng kir. (K) bn: Kirin. |
| **Rengkirî** | (hk.I.çewa) Hatîye rengkirin. : Dîwarê xanî yê reng kirîye. |
| **Rengkor** | (hk.I.çewa) Mirovê çavêd wî hinde rengan ji hev cuda na ke. |
| **Rengkorî** | (n.I.mê) Core êşeke çavên mirovî hinde rengan ji hev cuda nakin. |
| **Renik** | (n.dar.mê) rêzman Jêber. |
| **Renî** | (n.x.mê) Dema befir ji binve di bihujit ti li betenên gir û çiyan giran di bit bi hêz şikestin di kevitê di hêt xarê, gelek caran di be egera wêrankirina gund û deveran. |
| **Renîn** | (k.jn.x.mê) Dema mirov alavek zivir bi tiştekî ra di xişîne, pirt û kerên biçûk jê ve di ke. : Dar renî, Dîwar renî.(K) bdn : ez di renim em di renîn, tu di renî bûn di renin, ew di rene[. . .it] ewan di renin. P : dê[bi] + bdn. bdb: di renî, di renîn. Db,dûr : renîbû, .... Bûn. (F) : bi rene, bi renin. |
| **Renok** | (n.dar.mê) Amêreke li xwaringehan jibo renîna penîr, fêkî û htd bikar dihêt. Bîkar. |
| **Rep** | (hk.x.çewa) Bel. Berhev. Qît. Bilind. Biloq. : Guhêd vî hespî di repin. |
| **Repbûn** | (k.jn.I.mê) Belbûn. : Guhêd kerî ji tirsa gurî rep bi bûn. |
| **Repkirin** | (k.jn.I.mê) Dema mirov yan giyandar bê deng di bit di xazit bi bîzit çi denge, guhên xwe bel di kit , nexasim giyanewer. (K) bn: Kirin. |
| **Reprep** | (n.I.mê) deng Dengê pêyan dema rêveçnê. : Ji dengê reprepa pêyên wî ez ji xew rabûn. |
| **Reprepkirin** | (k.jn.l.mê) Deng ji pêyan hatin. .: Reprepê neke da cîran hêris nebin. |
| | (K) bn: Kirin |
| **Req** | (hk.x.çewa) 1.Tiştê qayîm.Tiştê ne nerim. Tund. Dijwar.. : Dîwarê, berê, asinê; req. Brx Nerim |
| **Reqbûn** | (k.jn.I.mê) Dema tişt req di bit.: Nan yê req bûy. 2. Mirin. Sekitîn. (K) bn: Bûn. |
| **Reqî** | (n.dar.mê)1. Rewiştê tiştê req.: Jiber reqîya erdî, kolana rezî bi zehmete. |

| | |
|---|---|
| **Reqkirin** | (k.jn.I.mê) Gihorîna made yan tiştên din ji gaz, şile û nerim bo reqî. (K) bn:Kirin. |
| **Resen** | (hk.x.çewa) Xurî. Xumalî. Bijavtî. |
| **Reş** | (hk.x.çewa) Rengê reş. Tarî.: Tenî a reş. Bizina reş. Rejî a reş. :Şeva reş. |
| **Reşadok** | (n.I.mê) giya Giyayek kesk û tamtîje, di gel zadan di hêt xwarin. |
| **Reşandin** | (k.jn.dar.mê) Av lêkirin bi çipikan.(K) bnd: ez di reşînim em direşînîn, tu di reşînî hûn di reşînin, ew di reşîne[. . .it] ewan di reşînin.. Pr : Dê [bi] reşînim, reşînîn, reşînî, reşînin, reşînit[...ne], reşînin. Bdb : di reşand, di reşandin. Db,dû:rşandibû, reşandibûn. (F): bi reşîne, bi reşînin |
| **Reşarî** | (n.dar.mê) Tiştê, cihê reş xuya bi ke. : Ji dûr reşati a wî xuya di kir. |
| **Reşbelek** | (n.I.mê) 1 .Saloxdana ciwanî ya rengên sipî û reş têkel. :Çavên reşbelek. Ang: çavên reş û sipîlka sipî.2.Şahîyaji jin û mêran pêkhatî. Govenda têkel. |
| **Reşbext** | (hk.I.çewa) Bextreş. |
| **Reşbûn** | (k.jn.I.mê) Reng ber bi reşî di çe. : Li ber tavê çerimê wî reş bû. |
| **Rege** | (n.dar.mê) Ji tirsan da helamet li ber çavên mirovî çê di bin. Sehim. Tirs. Batirsok.: Reşek jibo dewaran çê bi bû, lewra revîn. |
| **Reşeba 1** | (n.I.mê) Bahoz. Barove. |
| **Reşeba 2** | (n.I.mê) derd Derdê bawîbûnê. |
| **Reşedirî** | (n.i.mê) fêqî Dirî. |
| **Reşê** | (ngaz.dar.mê) Naznav û navê bangkirina jina reş. |
| **Reşêle** | (n.dar.mê) balinde Reşwêle. |
| **Reşik 1** | (hk.dar.çewa,n.dar.mê)1. Mirovê reş û lewaz. 2 .Reşîya çavî. Reşka çavî. |
| **Reşik 2** | (n.dar.mê) Corekê kevinê pêlavane. Kalik. Pend :Reşika reş, şiloxa sipî, eve ne, êka dî. |
| **Reşî** | (n.dar.mê) bn : Reşati. |
| **Reşîşe** | (n.dar.mê) Teveka bara kêm. |
| **Reşkirin** | (k.jn.I.mê) Rengê reş lêdan. :Jiber mirina xweşdivîyê xwe, xwe reş kirin. (K) : Kirin. |
| **Reşmal** | (n.I.mê) Xîvet. Kon. Çadir. |
| **Reşmar** | (n.I.nê) candar Marê reş yê bê jehir, yan jehirdar. |
| **Reşmêw** | (n.l.nêr)fêqî Core tirîyekê reng reşe. |
| **Reşniyîş** | (n.I.mê) Nivîsîna liser kaxwezan, hêj ne hatîye rastvekirin û çevtî û ne rêkî têda heye, pişti di hêt rasvekirin di xin ser kaxezeka din yan kompyûterê. |
| **Reşo** | (ngaz.dar.nêr) Navkirina peyayê reş. Mêrê reş. |
| **Reşpoş** | (hk.I.çewa) Mirovê cilên reş li ber xwe di ket ji xeman. |
| **Reşpoşkirin** | (k.jn.I.mê) Ji egera kovanekê mirov xwe bi cilkên reş di poşit. (K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Reşqelyan** | (k.jn.l.mê) Dema mirov li ber tava gerima havîne reş di bit û çermê mirovî wek qelyanê lê di hêt. (K) bn: Qelyan. |
| **Reşqelyayî** | (hk.l.çewa) Mirovê ji ber gerimê reş bûyî û qelyayî. |
| **Resresk 1** | (n.l.mê) 1.Corekê biharatane dindikên wî di reş û htirikin. 2. Perdeyên yan pirtên reş li ber çavan dumst di bin. |
| **Reşreşk 2** | (n.l.mê) can Reşka çavî. |
| **Reşrihan** | (n.l.mê) giya Rihana ciwan û reş ve. |
| **Reştale** | (hk.l.çewa) Mirovê reş. Dêzereş. Reş û tarî. |
| **Reştarî** | (hk.l.çewa) Reşê tarî. :Şeveka reştarî. |
| **Reşûkî** | (n.dar.mê) Coreke kevin ê tivengane. |
| **Rev** | (n.x.mê) Baz. Bazdan. Bez.: Segî da dû dizî, bi reva xwe ra ne gehişt. |
| **Revandin** | (k.jn.x.mê) Tiştekî yan mirovekî bi xurtî bi xwera bi bî. Rakêşan. Dizîn. : Pisê cîranê me jineka revandî. (K) bdn: ez di revînim em di revînîn, tu di tevînî hûn di revînin, ew di revîne[. . .it] ewan di revînin. Pr : dê bi + bdn. Bdb : di revand, di revandin. Db,dûr :ravandibii,revandibtin.(F): bi revîne, bi revînin. |
| **Revde** | (n.dar.mê) Bireka giyandaran bi hevre, wek guran û seyan. : Zivistanan revdeyên guran di mişene. |
| **Revend** | (hk.dar.çewa,n.dar.mê) 1. Mirovê ji wargeha xwe dûr di keve. Koçer. Revenda kurd li derveya welat. 2. Navê mêrane. |
| **Revî** | (n.x.mê) Bir. Revde. : Revîya dewaran. |
| **Revîn** | (k.jn.x.mê) Ji cihê xwe bi tirs yan xurtî derkevtin[çûn]. Bazdan. Teqyan. Pend :Revîn jibo mêran şerme.(K) bdn : ez di revim em di revîn, tu di revî hûn di revin, ew di reve[. . .it] e\yan di revin..Pr : dê[bi] revim, revîn, revî, revin, revit[...ve], revin. Bdb:ez di revîm,em di revîn, tu,ew di revî, hûn,ewan di revîn. Db,dûr : ez revîbûm,em revîbûyn, tu revîbûy, hûn,ewan revîbûn, ew revîbû. (F) : bi reve, bi revin |
| **Revîvan** | (kam.dar.dz) Nêçîvan. |
| **Revok 1** | (hk.dar.çewa) Yê ji tirsa neyaran di reve. |
| **Revok 2** | (n.x.mê) candar adî Kêzikeka firinde, reng gewir veye û jehirdare, hingivê wan şirîn û xweşe, di kunekeviran da şaneyan di danin. |
| **Revotik** | (n.dar.mê) candar Revok. |
| **Revrevik** | (n.l.mê) Sîtavk û sînahîyên liber çavên mirovî çê di bin, di rastî da nînin. |
| **Rewa** | (rd.x.çewa) Tişt, gotin, kiryar ên qanûnî yên mirovî maf heye pê ra bi be. |
| **Rewan** | (hk.x.çewa) 1 .Can. Giyan. Deron. 2. Zîx. peyt. Zîrek. Desthil. |
| **Rewanbêj** | (hk.l.çewa) Mirovê zîrek û desthil di gotin vehandina peyvan da. |
| **Rewanbêjî** | (n.l.mê) Şarezayî di warê selîqe, gotin û vehandina peyvan. :Waneya rewnbêjîya zimanê kurdî; ang çewayîya fêrbûna zimanê kurdî bi awayekê rast ciwan. |
| **Rewayî** | (rd.dar.çewa) Qanûnî. Yasayî. |

| | |
|---|---|
| **Rewêjtin** | (k.jn.x.mê) Birîn. Birîndarkirin. |
| **Rewişt** | (n.x.mê) Sinc. |
| **Rewiştpak** | (rd.I.çewa) Mirovê xwedî sinca pak. |
| **Rewiştpîs** | (rd.I.çewa) Sincpîs. Dehmenpîs. Bêrewişt. Bêsinc. |
| **Rewiştpîsî** | (n.I.mê) Bêsincî. Dehmenpîsî. |
| **Rewîn** | (k.jn.x.mê) Dengê segan. :Segê hewe îşev gelek ê di rewit, diyare dehbe yêd li dora gundî?. Pend :Se di rewit, karwanî bi rêya xwe di çit.ang; ne pêdivîye pûtey bi din gotinên vala yên mirovê pitpitî. |
| **Rewş 1** | (n.x.mê) 1 . Keyf Xweşî. Aram. Ronahî. : Rewşa malê zarokin. |
| **Rewş 2** | (n.x.mê) Bar. Kawdan. : Rewşa tenahîyê û welatê me pir başe. |
| **Rewşen** | (n.dar.mê) 1.Ciwan .2. Navê jinane. |
| **Rewşenbîr** | (rd.I.çewa) Mirovê xandî û zana. Xudan bîr, xwedî hizir. Ronakbîr. |
| **Rex** | (n.x.nêr) AI. Tenişt. Kêlek. Hêja li rex hevalî rûnişt. |
| **Rexne** | (n.x.mê) Destnîşankirina şaşîyan û dîyarkirina rêya çarekirinê.Rexnya avaker ; jibo baştirkirina dozê ye. Rexneya kavilker di bit egera têkdanê û ajawe yê. |
| **Rexnegir** | (pîşn.I.dz) Kesê karê wî rexne girtine. |
| **Rexnegirî** | (kam.dar.mê) Karê rexnegiran. |
| **Rexnegirtin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov rexneyê di gire. (K) bn : Girtin. |
| **Rexnekirin** | (k.jn.l.mê) Rexnegirtin. |
| **Rexnevan** | (pîşn.dar.dz) Rexnegir. |
| **Rexnevanî** | (kam.dar.mê) Rexnegirî. |
| **Rext** | (n.x.nêr) Qayîşeke taybet hatîye diristkirin jibo hilgirtina fîşekên tivengan. |
| **Rextik** | (n.dar.nêr) Kulindê zer. |
| **Rexûçan** | (n.I.pir) Dewrûber. Hemû alî. Nêçîrvan li rexûnên xwe nêrî dako nêçrekê bi bîne. |
| **Rexûdûr** | (n.I.pir) Rexûçan. |
| **Reyîn** | (k.jn.x.mê) Rewîn. |
| **Rez** | (n.x.nêr) Çem [bîstan] ê fêqî, bi taybetî tirî. |
| **Rezber** | (n.x.mê, hk.dem) Meha îlonê. |
| **Rezbirîn** | (k.jn.I.mê) Çinîna tirîyê rezan. Mizeyt. |
| **Rezil** | (rd.x.çewa) 1. Çirîk. Pîs. 2. melîl[melûl]. |
| **Rezîlbûn** | (k.jn.I.mê) 1 .Çirîkbûn. 2. Melûlbûn. |
| **Rezîlî** | (n.dar.mê) 1 . Pîsî.çirîkî. 2. Melûlî. |
| **Rezîlkirin** | (k.jn.I.mê) 1 . Gotinên kirêt û gef lê kirin. 2. Xwe bêçarekirin. Melûlkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Rezvan** | (pîşn.dar.dz) 1 . Xwedîyê rezî. Sexbêrkerê rezî.2. Navê xortane. |
| **Rezvanî** | (karn.dar.mê) Karê [pîşeya] rezan. Cotyari. Cotkarî. |
| **Rê** | (n.x.mê) 1.Cihê[şopa] mirov, giyanewer, tirombêl û htd lê hatinûçûnê di kin. 2. Awa. : Rêya çak û neçak. Rêya rast. |
| **Rêba** | (n.I.mê) Biyav. Seqa. |

| | |
|---|---|
| **Rêbaz** | (n.dar.mê) 1.Rêçik. Şop.2. Navek kurdî ye. |
| **Rêbendan** | (n.I.mê) Meha duwê ji werzê zivistanê ye. |
| **Rêber** | (pîşn.dar.dz) 1 . Yê şareza rê nîşa; xelkî bi dit.2. Navek kurdîye. 3. Serkêş. |
| **Rêberdan** | (k.jn.I.mê) Ji rê derkevtin. Berzebûn. Hindabûn. Dûrkevtin. : Gelê me rêya kurdînîyê tu caran bemade. |
| **Rêberî** | (kam.dar.mê) Rêzanî. Serkêşî. |
| **Rêberîkirin** | (k.jn.gl.mê) Serkêşîkirin. Rênîşadan. |
| **Rêbir** | (rd.l.çewa) Rêgir. Cerdevan. Çete. |
| **Rêbirîn** | (k.jn.I.mê) Rêgirtin. Kevtin di rê da. |
| **Rêbiwar** | (n.I.dz) Rêving. |
| **Rêbîn** | (rd.I.dz) 1. Yê rêya di zanit. Rêzan.Şareza. 2. Navek kurdî ye. |
| **Rêç** | (n.x.mê) Rê. Şop. |
| **Rêçal** | (n.I.nêr) J ajî.Binc. |
| **Rêçalî** | (rd.l.çewa) Xwarinên sipîyatî, wek mast, penîr, jajî û htd. Sipîyatî. Babê min hez ji xwarinêd rêçalî di ke. |
| **Rêçevan** | (pîşn.dar.dz) Rêbîn. Rêzan. |
| **Rêçevanî** | (kam.dar.mê) Rêberî. Rêzanî. |
| **Rêçik** | (n.dar.mê) Rêbaz. |
| **Rêçûn** | (k.jn.I.mê) bi Rêveçûn. bi Rêkevtin. (K) bn: Çûn. |
| **Rêda** | (n.dar.mê) Bingeh. Şengiste. |
| **Rêdan** | (k.jn.I.mê) Destûrdan. Hêlan. Delîvedan. Brx Rêgirtin yan nehêlan. (K) bn: Dan. |
| **Rêder** | (n.dar.dz) 1.Yê ko rê di det mirovî jibo encamdana karekî.2. Cih yan rêya derkevtinê. |
| **Rêdîn** | (n.x.mê) can Rihdîn Rîh. |
| **Rêdîr** | (rd.I.çewa) 1.Dûr ji warê xwe. Xerîb. 2.Navekê kurdî ye. |
| **Rêgeh** | (hk.cih,n.dar.mê) 1.Cihê rê lê derbaz di bit.2. Proje. |
| **Rêgir** | (rd.dar.çewa) Mirovê rê li xelkî di girit jibo karên xirab. Cerde. Çete.Diz. Talanker. |
| **Rêgirî** | ( kam.dar.mê) Mirovê karê wî rêgirtin be. |
| **Rêgirtin** | (k.jn.l.mê) 1.Şelandin. Xirankarî. Cerdeyî. 2. Girtina rêyan. Astengkirin. (K) bn: Girtin. |
| **Rêhebûn** | (k.jn.I.mê) Hebûna delîveya kirinê. Hebûna şiyanê. |
| **Rêhesin** | (n.l.mê) Rêya şemendefiran û makînên dî ya ji haesinî[asin] hatî çêkirin. |
| **Rêjan** | (k.jn.x.mê) bn: Rêjtin. |
| **Rêje** | (n.x.mê) Pirtek jê. Parçek dîyarkirî ji tenekî. : Rêjeya serkeftina qutabîyan ev sale 20% pitire ji par. |
| **Rêjgeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cih, çal yan gera av di rêjit nav. Sîlav. |
| **Rêjin** | (k.jn.x.mê) 1 . Kurîşk. 2. Kelişte. Kun. |
| **Rêjne** | (n.x.mê) Tava baranê.Rêjî. |

| | |
|---|---|
| **Rêjî** | (n.dar.mê) Hatina befir û baranan. :SaIeka bi rêjî ye ang: geleka barî. |
| **Rêjîk** | (n.dar.mê) Çekê otomatîk. |
| **Rêjîn** | (nl.dz) 1. Valakirin. :Av rêjtin. Kevtina şileyan. Rêjan. Rêjtin. (K) bdn: ez di rêjim em di rêjî, tu di rêjî hûn di rêjin, ew di rêje[...it] ewan di rêjin. Pr:dê[bi] rêjim, rêjîn, rêjî, rêjin, rêje. di rêje[...it] ewan di rêjin. Pr:dê[bi] rêjim, rêjîn, rêjî, rêjin, rêje. Bdb: di rêja, di rêjan.Db,dûr: rêjabti, rêjabûn. (F): bi rêje, bi rêjin. 2. Rêya jiyanê. Awayê jîyanî.2. Navê keç û xort an. |
| **Rêjtin** | (k.jn.x.mê) Valakirin. Rûkirin. (K) bdn: ez di rêjim em di rêjîn, tu di rêjî hûn di rêjtin, ew di rêje[. . .it] ewan di rêjin.Pr: dê bi +bdn. bdb: di rêjt, dirêjtin.[di rêja, di rêjan] db,dûr: rêjtibû, ... Bûn. (F): bi rêje, bi rêjin |
| **Rêikirin** | (k.jn.I.mê) Pakijkirina amanan .(K) bn: Kirin. |
| **Rêk** | (hk.cih,n.dar.mê) 1. Rêya biçûk. :Rêka gundî. 2. Hevbîr. Hevdeng. Kûk. :Ez û ew di kar û kiryaran da di rêkin. |
| **Rêkan** | ( hn,nl.dz) 1.Hozeka kurdane li Kurdistana Iraqê. 2. Navekê kurdî ye. |
| **Rêkanî 1** | (mal.dar.dz) Kesê ser bi hoza rêkanî ve. |
| **Rêkanî 2** | (hn.I.çewa) Rêya ko nû hati çêkirin. Rêya nû. |
| **Rêkêş** | (hk.I.çewa) 1 . Mirovê serkêşî ya bizavekê bi ke. Rêzan . Rêber. 2. Navê mêrane. |
| **Rêkirin** | (k.jn.I.mê) Dema mirov tiştekî jibo cihekî bi rêket. Bi şîne. Şandin. Virê(bi rê)kirin. (K) bn: Kirin. |
| **Rêkkevtin** | (k.jn.I.mê) Morkirina peymanan. Pêkkirin. Pêkhatin. Li hevhatin. (K) bn: Kevtin. |
| **Rêklam** | (n.biyan.mê) Dane nasîna kelûpelan, deste û dezgehan û htd.Ragehandin. |
| **Rêkûpêk** | (rd.l.çewa) Peyt. Dirist. bi Serûber. :Xortekê rêkûpêk. :Jineka rêkûpêk. |
| **Rêkûpêkbûn** | (k.jn.gl.mê) Peytbûn. Berhevbûn. bi Serûberbûn. (K) bn:Bûn. |
| **Rêkûpêkî** | (n.gl.mê) Serûberî. Peytî. |
| **Rêkûpêkkirin** | (k.jn.gl.mê) bi Serûberkirin. Peytkirin. Berhevkirin. (K) bn:Kirin. |
| **Rêkxer** | (pîşn.dar.dz) Daner. Avrêner. Avaker. |
| **Rêkxiraw** | (n.dar.mê) bn :Rêkxistî. |
| **Rêkxistin** | (k.jn.I.mê) Karê mirov rêk bêxe.çê biket. (K) bn: Xistin(êxistin). |
| **Rêkxistî** | (n.dar.mê) bn: Rêkxiraw. Deste, Bir, a hatî avakirin jibo encamdana karê bo hatî destnîşankirin. : Rêkxistîya xaça sor.Rêkxistî. |
| **Rêl** | (hk.cih,n.x.mê) Cihê pir darû bar. Dehil.Daristan. |
| **Rêlêgirdn** | (k.jn.gl.mê) Rê li kesek yan cihek hatî girtin. Rêgirtin. |
| **Rênas** | (rd.I.çewa) 1. Rêber. Şareza. Nexşdaner. 2. Navek kurdî ye. |
| **Rênasî** | (kam.I.mê) Şarezayî. Rêzanî. |
| **Rênasîn** | (k.jn.I.mê) Rêzanîn. Nexşedanan. (K) bn: Nasîn. |

| | |
|---|---|
| **Rêncber** | (pîşn.dar.dz) Karker. Zehmetker.:Ez rêncberim. :Ew mirovekê rêncbere. |
| **Rêncberî** | (kam.dar.mê) Karkirin. Paleyî. Kasibî. ::...rêncberîyê ji xwe ra di ke. |
| **Rênçî** | (rd.dar.çewa) Dema masolkên leşê mirovî ji egera westanê(kar) girj yan xav di bin û jan jê di çin. |
| **Rêncîbûn** | (k.jn.l.mê) Weke masolên leşî xav yan girj di bin. :Destê min rêncî bûye.(K) bn: Bûn. |
| **Rêncîkirin** | (k.jn.I.mê) Mirov leşê xwe bi westîne.:Piçek pêhin a xwe vede, nê te giyanê xwe rêncî kir!.(K) bn: Kirin. |
| **Sernişîvkirin** | (k.jn.gl.mê) Ser jibo rexê binî çemandin. Demişîvkirin. |
| **Sernivîs** | (n.I.mê) Sergotar. |
| **Sernivîser** | (pîşn.l.dn) Sernivîskar. |
| **Sernivîskar** | (pîşn.I.dn) Serokê nivîserên govar yan rojnameyan. |
| **Sernixûn** | (hk.I.çewa) Sernişîv. |
| **Sernixûnbûn** | (k.jn.I.mê) Sernişîvbûn. |
| **Sernixûnî** | (n.I.mê) Sernişîvî. |
| **Sernixûnkirin** | (k.jnl.mê) Sernişîvkirin. |
| **Sernûçe** | (n.I.mê) Navnîşan yan destpêka nûçeyan. |
| **Serok** | (pîşn.dar.dn) Kesê rêvebirîya ,deste, dezgeh, part,welat û htd bi stoyê xwe ve di gire. Rêber. Serkêş. |
| **Serpel** | (pîşn.dar.dz) Efserê leşkerî yê piledar. |
| **Serperişt** | (pîşn.dar.dn) Kesê nêrevanî û dîvçûna karê deste, dezgeh û htd di ket. |
| **Serperiştî** | (kam.dar.mê) Karê serperiştî. |
| **Serperî** | (n.I.mê) Seroka perîyan. Seroka perîyên deryayî. |
| **Serpêhatî** | (n.I.mê) Serhatî. |
| **Serpola** | (hk.I.pesin.çewa) 1.Bi hêz. 2.Riko.Serreq. Serasin. |
| **Serpoş** | (n.I.mê) 1. Derpoş. Dervank. 2. Dersok. Hîzar. Hîşar. |
| **Serrast** | (hk.I.çewa) Rast. Rêya rast. Li ser rastîyê. |
| **Serrastbûn** | (k.jn.gl.mê) Piştrastbûn. Serrêbûn. |
| **Serrastkirin** | (k.jn.gl.mê) Piştrastkirin. Rêya rast nîşêdan. |
| **Serrêkirin** | (k.jn.gl.mê) Pêra derkevtin û rê nîşadan. Rê nîşadan. (K) bn : Kirin. |
| **Serrû** | (n.l.nêr) Rûyê mirovî yê bilindê ko di keve navbera çan alekê. |
| **Sersal** | (hk.dem,n.I.mê) 1.Serê sala nû û dawîya sala kevin.2. Newroz. |
| **Sersax** | (rd.l.çewa) Mirovê sersax ; mirovê bê arêşe û kêmasî. |
| **Sersaxî** | (n.I.mê) Behîdarî. |
| **Sersaxîkirin** | (k.jn.gl.mê) Sersaxî lê kirin. Dema mirovek di çit ber dilovanîya xudê, xelik daxaza sersaxî û hedarê jibo kesûkarên wî di bêjin. |
| **Sersaxîxwaztin** | (k.jn.gl.mê) Sersaxîlêkirin. Sersaxîkirin. |
| **Serserî** | (hk.I.çewa) Şilatî. Kolanî . Pûç. Krnehatî. |
| **Sersûr** | (rd.I.çewa) Hicmetîbûyî.. Seyrmayî. |
| **Sersûrman** | (k.jn.gl.mê) Hicmetîbûn. Seyrman. |
| **Serşîr** | (n.I.mê) Sertûk. Qeymax. |
| **Serşok** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê [jora] mirov ser û leşê xwe lê di şût. |
| **Serşor** | (hk.I.çewa) Mirovê karekê xirab di ke, serê xwe di tewîne ji şerman da. Br x Serbilind. |
| **Sertaser** | (hk.I.çewa) Seranser. |
| **Sertazî** | (hk.I.çewa) bn :SerkoI. |
| **Sertazîbûn** | (k.jn.gl.mê) Serkolbûn. :Ez sertazî di bim. Ew sertazî bû. |
| **Sertazîkirin** | (k.jn.gl.mê) Serkolkirin. :Heroj êvarî mamê min xwe sertazî di kir. |

| | |
|---|---|
| **Serteşîk** | (n.I.mê) **candar** Giyandarekê biçûke, firindeye mîna, teşîyane li nêz av û daran di jît û xwarina wê pêşikin. |
| **Sertil** | (n.I.mê) **can** Serê tilîyan dest yan pêyan yên mirov û candaran. |
| **Sertiraş** | (pîşn.I.dz) Kesê karê wî tiraşîna rih û pora serê mirovane. |
| **Sertiraşîn** | (k.jn.I.mê). Tiraşîna por yan rihan. (**K**) bn: Tiraşîn. |
| **Sertiraşxane** | (hk.cih.mê) Cihê tiraşîna pora seran. |
| **Sertûk** | (n.I.nêr) **spîyatî** Xwarineka çevrîye wek texek [tîkek] tenik li ser mast û şîrî paş kelandinê çê di bit.Sertîk. Serşîr. |
| **Serûber** | (hk.I.çewa)Rêkûpêk. Peyt. Zîx. Berhev. : Çend xortekê bi serûbere. |
| **Serûberbûn** | (k.jn.gl.mê) Rêkûpêkbûn. |
| **Serûberî** | (n.l.mê) Rêkûpêkî. Peytî. :Ez di serûberîya te tênagehim. |
| **Serûberkirin** | (k.jn.gl.mê) Peytkirin. Rapêçan. :Xwe bi serûber bi ke dê mêvan bo me hên.<br>(**K**) bn : Kirin. |
| **Serûbin** | (hk.I.çewa) bn :Serabin. |
| **Serûbinbûn** | (k.jn.gl.mê) bn :Serabinbûn. |
| **Serûbinî** | (n.l.mê) bn :Serabinî. |
| **Serûbinkirin** | (k.jn.gl.mê) bn :Serabinkirin. |
| **Serûçav** | (n.l.pir) Rû. Sîma. Serûsîma. |
| **Serûpêk** | (n.gl.pir) **xwarin** Xwarineke ji serik û pêpikên kewalan di hêt lênan. Paçe. |
| **Serve** | (hk.dar.çewa) 1. Tiştê berçav. Li serî. 2. Mirovê sade. Vekirî. |
| **Servekirin** | (k.jnlmê) 1.bi Servekirin. Êxistinser. Existinê. : Karwanî hevsar bi ser hespî ve kir.2. ji Servekirin ang ; jêvekirin. Ji serî vekirin. Di serda hînan.(**K**) bn : Kirin. |
| **Serwer** | (hk.pesn.çewa) 1 . Semyan. Ser. Serok.2. Navê mêrane. |
| **Serwerî** | (n.dar.mê) Yekêtî. Semyanî. Serdarî. Hevgirtin. :Parastina serwerîya axa Kurdistanê erkê ser milên me hemûyane. |
| **Serxoş** | (hk.l.çewa) Mirovê jiber vexwarina kiholê mest bûye. Mest. Gêj. |
| **Serxoşbûn** | (k.jn.gl.mê) Mestbûn. Hay ji xwe neman. Gêjbûn. : Areq vexwar, serxoş bû. (**K**) bn : Bûn. |
| **Serxoşî** | (n.I.mê) Mestî. Mestbûn. |
| **Serxoşkirin** | (k.jn.gl.mê) Mirov yekî yan xwe bi vexwarinê mest bi ke.(**K**) bn : Kirin. |
| **Serxur** | (rd.I.çewa) Mirovê derd û belayê di hînit. Mirovê kur. |
| **Serxwe** | (rd.I.çewa) 1. li Serxwe. Ang ; xweragir. Peyt. 2. Hêdî. bi Aram. 3. Aza. Azad. |
| **Serxwebûn** | (k.jn.gl.mê) Azadbûn Serbestbûn. :Em serxwebûna Kurdistanê di xwazîn. |
| **Serxweş** | (hk.l.çewa) Serxoş. |
| **Serxweşbûn** | (k.jn.gl.mê) Serxoşbûn. |
| **Serxweşî** | (n.l.mê) Serxoşî. |
| **Serxweşkirin** | (k.jn.gl.mê) Serxoşkirin. |
| **Serzik** | (n.I.mê) **can** Parçeya serî, alê serî yê zikî. |

| | |
|---|---|
| **Setil** | (n.x.mê) Amaneke destikek pêve ye, jibo av û mita têkirinê bi kar di hêt.Cerdel. |
| **Setimîn** | (k.jn.x.mê) Pêyên mirov yan canewer an ji ber di çin yan di tiştekî di hilingivin û di kevin. Hilingivîn.[tin]. (**K**) bdn: ez di setimim em di setimîn,tu di setimî setimîn, ew di setime[...it]ewan di setimin. Pr:dê [bi] setimin setimîn, setimî setimin, setime. **Bdb**: ez di setimîm em,hûn, ewan di setimîm, tu, ew di setimî.**Db,dûr**: ez setimîbûm em setimîbûyn, tu setimîbûy htin setimîbûn, ew setimîbû ewan setimîbûn. (**F**): bi setime, bi setimin. |
| **Sevî** | (n.x.mê) Selikek mezin û kûre jibo fêqî û mitayî bi kar di hêt li ser pişta dewaran bar di kin. :Sevî ya tirî, xoxan, sêv û htd. |
| **Sewda** | (n.x.mê) 1.Evîn.2. Mestî. |
| **Sewdaser** | (hk.I.çewa) Evîndar. Mest. Gêj. |
| **Sexbêr** | (hk.çewa) Paristî. |
| **Sexbêrî** | (n.dar.mê) Çavdêrî. Paraztin[ paristin]. : Min bawerî bi sexbêrîya wî bo malê nîne. |
| **Sexbêrkirin** | (k.jn.dar.mê) Çavdan. Çavdêrîkirin. :Heger kes li mal nema, ez dê sexbêrîya zarokan bi kim. (**K**) bn : Kirin. |
| **Sexbêrvan** | (karn.I.dz) Yê sexbêrîya zarok, mal û htd di ke. |
| **Sexmerat** | (pêrb) **rêzman** Alaveke jibo egerê bi kar di hêt. Ji pêxemet. Jibona. |
| **Sext** | (hk.x.çewa) Dijwar. Tund. |
| **Sexte** | (hk.x.çewa) Karê ne rewa. Tiştê ne dirist. Zir. Xap. : Parê sexte, nasnameya sexte û htd. |
| **Sexteçî** | (pîşn.dar.dn) Sextekar. |
| **Sextekar** | (pîşn.dar.dn) Mirovê xapînok. Mirovê karê sexte di ke. |
| **Sextekirin** | (k.jn.I.mê) Kirina karên sexte. Xapandina xelikî. |
| **Seyda** | (pîşn.x.dz) Jibo rêzgirtinê bi kar di hêt.Mamosta. |
| **Seyr** | (hk.x.çewa) Tişt, bûyer, candar yan mirovê cihê hicmetîbûnê. Balkêş. |
| **Seyran** | (n.x.mê) 1.Geryan, bêhinvedan û xwarin li çûl çîyan. 2. Navê pîrekane. |
| **Seyrangeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê dilveker û xweş yê seyranî demên xwe lê derbaz di kin. |
| **Seyranî** | (karn.dar.dz) Yên di çin seyranê. |
| **Seyrankirin** | (k.jn.I.mê) Çûn seyranan. :Me îro seyraneka xweş kir. |
| **Seyrkirin** | (k.jn.I.mê) Temaşekirin. Nêrîn. |
| **Seyvan** | (hn,pesinçewa.ndar.nêr) Nîşanxweş. Sêrevan. Segvan. |
| **Sê** | (hijn.x.çend) Hijmara 3. 6-3=3. 1+2=3. **Pend** :Sê tişt di xweşin; rez, pez û jin. |
| **Sêbare** | (hn.nûvekirin) Sê caran rû di dit. Sêcarkî. |
| **Sêbarebûn** | (k.jn.gl.mê) Sêcarkî hatin rûdan. |
| **Sêbarekirin** | (k.jn.gl.mê) Jibo cara sêyem karekî bi keyeve. Sêcarkîkirin. |
| **Sêbisk** | (n.I.mê) **giya** Giyayekê xwarinê ye davên wî wek biskane. |
| **Sêcar** | (hn.I.çend.) Karê sêbare di bit. Sê caran bi hêt kirin. |

| | |
|---|---|
| **Sêçerxe** | (n.I.mê) Tirombêl yan paysikil yên ji sê tayêran pêkhatîne. |
| **Sêdare** | (n.I.mê) Sê darên çiklandî û serên wan gehiştîne hev, jibo hilawîstina meşk yan kujtina mirovan bi kar di hêt. Sêpêk.Qinare. |
| **Sêdaredan** | (k.jn.I.mê) Hilawîstina mirovan bi êxistina bendikê sêdarê li hefkê ta bêhin lê çik di be û di mire. Hilawîstin. Qinarekirin. (**K**) bn: Dan. |
| **Sêgeh** | (n.l.mê) Çengala bi sê tilîyan. |
| **Sêguh** | (n.I.mê) Milhêba bi sê çikilan. |
| **Sêhem** | (hij.rêz.çend) Ya,yê,yên sêyê. |
| **Sêhemîn** | (hijn.rêz.çend) Ya ,yê, yên sêyê û dawîyê. |
| **Şêhizar** | (hijn.l.çend) Hijmara 3000. |
| **Sêk** | (n.x.mê) Sihik. Sîhêk. Ava tirş. |
| **Sêl** | (n.x.mê) 1 .Parçeka kanzayê xire, rexek [kûr û yê din bel]e, li ser agirî di hêt danîn, nan li ser alîyê bel di hêt birajtin.2 Sênîya setelaytê ya ko li ser bilindayîyan di hêt danan jibo wergirtina kenalên têlevizyonê yên esmanî. |
| **Sêlik** | (n.dar.mê) 1. Sêla biçûk. 2. Sêlên nemazene, deng, reng, bername liser dihên tomarkirin liser amêran wek kompyoter, tomar û htd bi kar di hên. CD. |
| **Sêlwane** | (n.dar.mê) bn :Sîvan. |
| **Şêmilyon** | (hijn.I.çend) 3,000000. |
| **Sênî** | (n.x.mê) Amanekê pan û mezine, xwarin û nanî di xin nav da. |
| **Sênîk** | (n.dar.mê) Sênîyek biçûke, ji kanza, dar, feyfûr û htd hatîne çêkirin jibo têkirina girar, avik û htd. |
| **Sêpê** | (n.I.mê) Bingireke ji pêpikan pêhatîye jibo ragirtina amêrên mîna kamêre, çek, pertalên wênegirtinê û htd.Sêdark. |
| **Sêran** | (n.x.mê) bn: Seyran. |
| **Sêranî** | (karn.ndar.dz) bn: Seyranî. |
| **Sêriyan** | (hk.cih,n.I.mê) Cihê ji alîyan rê di gehitê. |
| **Sêsed** | (hijmn.l.çend) Hijmara 300. |
| **Sêşem** | (hk.dem,n.I.mê) Sêşemb. |
| **Sêşemb** | (hk.dem,n.I.mê) Rojeke ji yên heftîyê, navbera duşemb û çarşembê. Sêşem.Roja sîyê ji heftîyê(heger ji êkşembê dest pê bi ken). |
| **Sêta** | (hk.I.çewa) Ji sê tayan pêkhatî. Sêbare.Sê çeq. |
| **Sêtik** | (ndar.nêr) Sê tişt, sê mirov bi hevre.:Sêtikên li mala henê, birayên hevin. |
| **Sêtîr** | (n.I.mê) **çek** Corekê kevin ê tivengane. |
| **Sêv** | (n.x.mê) **fêqî** 1.Fêqîyek biharî û havînî ye, tam şirîn yan mize, gelek cor û şêwe hene. 2. Dara sêvê. |
| **Sêvaxînk** | (n.l.mê) **giya** Sêvbinerd. |
| **Sêvbinerd** | (n.gl.mê) **giya** Core giyayeke, reng keske,serikên mîna pitatan di bin erdî da mezin di bin. |
| **Sêvê** | (ngaz. Dar.mê) Naznav yan navê keçane. |
| **Sêwirandin** | (k.jn.x.mê) Helbest, gotin, peyv ; kirin stiran. |
| **Sêwî** | (rd.dar.çewa) Zaroyê bê dayk, bê bav yan bê daybab. |

| | |
|---|---|
| **Sêwîman** | (k.jn.l.mê) Mirina yek yan herduyan ji dayk û babên zaroyan. Zaro bê dayk, bê bab yan bê daybab man. |
| **Sêwîxane** | (hk.cih.n.dar.mê) Cihê xwedîkirina sêwîyan. |
| **Sêyek** | (hn.çend) Yek ji sêyan. Ji sêyan êk. 1/3. :Sêyeka mirvên .. ne di xandevanin. |
| **Sêzdeh** | (hijn.l.çend) Hijmara 13. |
| **Sêzdehem** | (hijn.rêz.çend) Yên,ya, yê sêzdehê. |
| **Sêzdehemîn** | (hijn.rêz.çend) Sêzdehem. |
| **Sêzdehizar** | (hijn.l.çend) 13,000. |
| **Sêzdemilyon** | (hijn.l.çend) 13,000,000. |
| **SHHK** | (kurt) Serokê Hikometa Herêma Kurdistan. |
| **SHK** | (kurt) Serokê herêma Kurdistanê. :M Barzanî êkemîn serokê Kurdistnê |
| **Sibahî** | (hk.dem) Roja yekê ya bi hêt. Roja piştî çend demhijmêran. Sibe. :Subahî eynîye,roja bêhinvedanê ye. |
| **Sibat** | (hk.dem,n.x.mê) Meha sêyê ji zivistanê. **Pend** :Sibatê berif û Ta tê, kur ji çîya tê, kiç ji gîyay tê. **Pend** :Sibatê gote biharê, bide min rojekê ji yên avdarê, da çermê gîskî bi serda bînim xwarê. Şiwat. |
| **Sibe** | (hk.dem) Subahî. |
| **Sibetir** | (hk.dem) Dusibe. |
| **Sibit** | (n.x.mê) **giya** Giyayek kesik û dav zirave,tam xweş, bi terî yan hişkî di kin nav dew zadan. |
| **Sifir** | (n.x.mê) Core kanzayekê reng ser zerîve ye.[mêtal] : Amanên sifrî. |
| **Sifre** | (n.x.mê) Sênî yan naylonê danayî li erdî yan ser mêzan jibo danana xwarinê liser. |
| **Sifredanan** | (k.jn.l.mê) Raxistina sênî yan naylonan jibo xwarinê liser rêz bi ken. |
| **Sih** | (n.x.mê) 1 . Sîber. 2. Endamê henaseye, di nav singî da ye. Piş. 3.Hijmara30. |
| **Sihik** | (n.dar.mê) Corek tirşîyê şile ji fêqî di hê çêkirin. Sîhêk. Sirke. |
| **Sikir 1** | (n.x.nêr) Cih yan dîwareke hatîye avakirin jibo pengîn û xirvekirina avê. Pengav. |
| **Sikir 2** | (n.x.mê) **candarzanî** Gerî. Gewrî. |
| **Sikitîn** | (k.jn.x.mê) bn : Sekitîn. |
| **Sil** | (hk.x.çewa) Yê naxwazit di gel çi kesî bi peyvit.Ne haşt. Bêgêwil. Zîz. |
| **Silal** | (hk.cih.x) Li serî. Taxê serî. Texa serî. Serbanî. Br x Xarê. :Havînan em li silal di nivîn. |
| **Silamet** | (hk.x.çewa) Bê bela. Sax. |
| **Silav** | (n.x.mê) Gotineke jibo dem başî li hev kirinê roj baş, şev baş, çewanî û htd. |
| **Silavdan** | (k.jn.l.mê) SiIavkirin.:Çewanî çakî gotin. |
| **Silavgirtin** | (k.jn.l.mê) Bersiva silavdanê. Silav wergirtin. |
| **Silavkirin** | (k.jn.l.mê) Çewanî başî di gel hev kirin.Daxazkirina xeşî Ye.: Min silav kire wan. :Seyda silav kir xwedekaran. (**K**)bn: Kirin |

| | |
|---|---|
| **Silavlêkirin** | (k.jn.gl.mê) Şandina silavan jibo heval, xizim û htd bi name yan di gel yekî. :Heger tu çûye mal silavên min li babê xwe bi ke. (**K**)bn: Kirin |
| **Silavrêkirin** | (k.jn.gl.mê) Dema mirov silavan ji yekî ra rê di ke.Silavvirêkirin.silavbirêkirin. Silavşandin. : Wî bi hevalekî ra silav ji min ra rêkirin. |
| **Silbûn** | (k.jn.l.mê) Dema mirov sil di be. Zîzbûn. :Dilê zarokan ne hêlin da sil ne bin.(**K**)bn: Bûn. |
| **Silêvaneyî** | (malb.n) Hozeke li Kurdistanê. |
| **Silî** | (n.dar.mê) Silbûn. |
| **Silk** | (n.x.mê) **giya** Core giyayeke bi serike, belgên wî pan û keskin, serik, bistî û belgên wî jibo xwarinê mifa jê di hêt wergirtin, gelek cor hene; silka sor, sipî û ya şekirê. **Pend** : Serê wekî silkê lê kir.ang; serê rûtkirî. **Pend** :Silka wî sor kir.ang; direwa wî serav kir. |
| **Silkirin** | (k.in.I.mê) Eger mirov dilê yekî bi hêlit. Zîzkirin. :Ka bêje çima bavê te tu sil kirî?.(**K**) bn: Kirin. |
| **Silsilok** | (hk.I.çewa) Kesê zû sil di be. |
| **Sim** | (n.x.nêr) **can** Pêyên canewerên wek kewal, çêl û dewaran. |
| **Simandin** | (k.jn.x.mê) Kunkirina darik, dîwara, leş û htd bi tîrik û makînan. Simîn. |
| **Simaq** | (n.x.mê) **dar** 1.Dara simaqê. 2. Mitayeke dindikên wî wek nîskane, tam tirşe, jibo tirşkirina zadî bi kar di hînin. Simaqa zêbarê ya bi navdenge. |
| **Simbêl** | (n.x.pir) Mûyên li bin kepîyê zelaman. |
| **Simbêlboq** | (hk. pesinl.çewa) Yê simbêlên wî mezin wek boqên pîvazan. |
| **Simbêlçixt** | (hk,pesin.I.çewa) Mirovê simbêlên wî di badayî û sertîj,serçixt. |
| **Simbêlreş** | (hk.pesinl.çewa) Kesê rengê simbêlên wî reş. |
| **Simbêlsor** | (hk.pesinl.çewa) Zelamê simbêlên wî sor. |
| **Simbêlşor** | (hk,pesinnl.çewa) 1. Zelamê simbêlên wî di şor. 2. Şermizar. Serşor. |
| **Simbêlzer** | (hk,pesinl.çewa) Yê simbêlên wî reg zer. |
| **Simîn** | (k.jn.x.mê) Kunkirin bi şîşkek zirav. Darcigark simtin. Dîwar simtin. [mamik] :Himhime dîwar sime ango; (deng). (**K**) bdn: ez di simim em di simîn, tu di simî hûn di simin, ew di sime[....it] ewan di simin Pr : dê[bi] simim, simîn, simî, simin, simit[. . .me], simin. Bdb : di simî, di simîn.db,dûr : simîbû,(simtibû), simîbûn(simtibûn). (**F**) : bi sime, bi simin. |
| **Simîtk** | (n.dar.mê) **xwarin** Corekê danhêrkîye. |
| **Simtin** | (k.jn.x.mê) Simîn. (**K**) bdn: Ez di simim em di simîn, tu di simî hûn di simin, ew di sime[. . ..it] ewan di simin Pr : dê[bi] simim, simîn, simî, simin, simit[...me], simin. Bdb : di simî, di simîn.db,dûr : simîbû,(simtibû), simîbûn(simtibûn). (**F**) : bi sime, bi simin. |
| **Simtî** | (rd.dar.çewa) Kunkirî. Cihê kun tê vekirî. :Guhê simtî jibo guharkan. |
| **Sinc** | (n.x.nê) Rewişt. :Ji alîyê sincî ve çi kêmasî li wê nînin. |
| **Sincan** | (hk,hn.dar.çewa) 1. Xwedî rewişt. Bi cinc. 2. Navê mêrane. |
| **Sincaq** | (n.x.mê) Derzîkeka badaye jibo bestina cilikan bi kar di hêt. |
| **Sincvan** | (hk,hn,çewa) Xudan sincek baş. Xwedî rewiştek çê. Birûmet. |

| | |
|---|---|
| **Sindan** | (n.x.nêr) Corek cerîye ji axê yan asinî di hêt diristkirin bo têkirina dexil û mitayî bi kar di hêt. |
| **Sindirîk** | (n.dar.mê) Sindoqeka taybete rairîyan di xin nav. |
| **Sindî** | (malbna) 1. Hozeka kurdane li Kurdistana Iraqê.2. Kesê ji hoza sindîyan. |
| **Sindoq** | (n.x.mê) Elbikeke heme cor û şêweye, mita, fêqî,cil û htd di ken têda. |
| **Sine** | (hk.cih,cugir.n) Bajarkeke li Kurdistana Iranê. |
| **Sinetkirin** | (k.jn.I.mê) Birîn, jêvekirina çermkê zêde ji endamê mirovan yê nêrîne yê mîzî. |
| **Sinetkirî** | (hk.I.çewa) Zarokê hatî sinet kirin. |
| **Sinêle** | (hk.x.çewa) Jiye mirovî navber zarokînî û mezinîyê da. Nîvmêr. |
| **Sing 1** | (n.x.nêr) 1. **can** Cihê di navbera zik û gerdena mirovî ji alîyê berî ve.2. Ber. Br x Pişt. |
| **Sing 2** | (n.x.nêr) Darekê sertîje di erdî û dîwaran di qutin jibo girêdana dewaran û qayîmkirina xîvet û karên din. Gilç. |
| **Singfireh** | (hk.l.çewa) Bêhinfireh. |
| **Singqutan** | (k.jn.I.mê) Sing di cihekî ra kirin, qutan: Singek di dîwarî quta.**pend** :Her singê ez di qutim tu cantekî pêve di kî ango Tu çi bo min nahêlî. |
| **Singvekirin** | (k.jnlmê) Mirov yê bêhinfireh bit jibo her rexne gazinde û pisyaran. (**K**) bn: Kirin. |
| **Singvekirî** | (rd.I.çewa) Mirovê sinêwî jibo her pisyar, rexne û gazinan ve kirî. |
| **Sinik 1** | (n.x.nêr) **candar kirmijok** Gêzik. |
| **Sinik 2** | (n.x.mê) **candar kirmijok** Core kêzikeka kimijoke liser genim û danana dijît û ziyanê lê di dit. |
| **Sinûr** | (n.x.nêr) Tuxwîb. |
| **Sipas** | (n.x.mê) bn :Supas. |
| **Sipehiyandin** | (k.jn.mê) Sipehîkirin. Xemlandin. |
| **Sipehî** | (hk.x.çewa) Xweşik. Rind. Ciwan. |
| **Sipehîbûn** | (k.jn.l.mê) Rindbûn. (**K**) bn: Bûn. |
| **Sipehîkirin** | (k.jn.I.mê) Xweşikkirin. Ciwankirin. (**K**) bn: Kirin. |
| **Sipehîtî** | (n.dar.mê) Ciwanî. Rindî. |
| **Sipêde** | (hk.dem) Destpêka rojê. Elind. |
| **Sipî** | (hn.çewa) **reng** Rengê sipî. Rengê berfê, mastî û htd. |
| **Sipîbûn** | (k.jn.I.mê) Dema rengê mirov yan tiştî sipî di bit..: Jiber dernekeftinê ew yê sipî bûy. (**K**) bn: Bûn. |
| **Sipîkirin** | (k.jn.l.mê) 1. Rengê sipî lê kirin. :Dîwar bi rengî sipî kir. 2. Qelp yan tîvkilê tiştî jêkirin.Loçkirin. Xiyar, kulind û htd sipîkirin. (**K**) bn: Kirin. |
| **Sipîkarî** | (hk.I.çewa) Hatîye sipî kirin. Lûçkirî. Sêva sipîkirî. |
| **Sipîndar** | (n.l.mê) **dar** Dareke ta dirêj û bilinde, belg kesik û bi xemle, darên wê wek garîte, kête û dep mifa jê di wergirin. |
| **Sipîtale** | (hk.çewa) Tişt yan mirovê reng sipî. |
| **Sipîvatî** | (hk.çewa) 1. Rengê sipî. 2. Berhemê şîrî. Mast, jajî, penîr û htd. |
| **Sirgun** | (nx.mê) Dûratî ya mirovî ji war, welatê xwe. |

| | |
|---|---|
| **Sir** | (hn.x.çewa,n.x.raê) Serraayeka dijwar. Seqem. :Rojeka sire. :Eve çi sireka dijware. |
| **Sirbirin** | (k.jn.I.raê) Ji egera lêdana sirê, fêqî û mita xirab di bin di rizin. |
| **Sirbistan** | (hk.cih,welatn.dar) Welatê Sirbîyan. Sêrbiya. |
| **Sirbî** | (nei.n) Xelkê Sirbistanê. |
| **Sirbûn** | (k.jn.I.raê) Hin giyandar jibo heyarakê xwe di nav tevinekî da di pêçin û bizava wan ra diwestit.(K) bn: Btin. |
| **Sirgûn** | (n.x.raê) Dûrwelat. Biyanistan. |
| **Sirgûnkirin** | (k.jnlraê) Bi xurtî ji warî derêxistin. (K) bn: Kirin. |
| **Sirke** | (n.x.raê) Sihik. |
| **Sirt1** | (hk.cih,n.x.raê) Peyarêkeke di ber serê gir yan serê çiyayan ra derbaz di bit. : Şivanî pezê xwe li sirta çiyayî di çerand. |
| **Sirt 2** | (hk.x.çewa) Kezê zû karê xwe bi dawî di hîne.Mirov yan candarê sivik, çeleng. |
| **Sirûd** | (n.x.raê) I.Stranên nîştimanî.2 Navekê duzayende. |
| **Sirûşt** | (n.x.raê) bn: Xurist. |
| **Sisê** | (hijn.çend) Hijara sê. Hijraara 3. |
| **Sisî** | .(n.x.raê) Danê kengiran dema di qelînin û wek çerez di xon. Tovê kengiran. Kengiroşk. |
| **Sist** | (rd.x.çewa) Xav. Ne tund. Ne rijd.: Ev girêye ya siste, dê zû vebit. : Ew di kar û gotin ên xweda yê siste. |
| **Sistbûn** | (k.jn.I.raê) Xavbûn. : Doxîna şelê wî sist bû û kevte teşkan. |
| **Sistê** | (ngaz.raê) Navkirîna jina sist. |
| **Sisrî** | (n.dar.raê) Xavî. Bêxeraî. |
| **Sistkirin** | (k.jn.I.raê) Xavkirin. Lêvekirin. |
| **Sisto** | (n.gaz.nêr) Navkirina mêrê sist û xav. |
| | 621 |
| **Standin** | (k.jn.x.mê) Wergirtina bi xurtî. Bi kar înana hêzê jibo wergirtina tiştekî. Gelê kurd dê raafê xwe bistîne.(K) bdn: ez di stînira era di stînîn, tu di stînî hûn di stînin, ew di stîne [. . .it] ewan di stînin. Pr: dê [bi] stînira, stînîn,stînî, stînin, stînit[...ne],<br>stînin. Bdb : di stand, di standin. Db,dûr : standibû,standibûn. (F): bistîne, bistînin. |
| **Sitem** | (n.x..raê) Xurtî. Zorî. |
| **Sitemkar** | (hk.I.çewa) Kes yan dezgeha sitemê li xelkê di ket.Zordar. |
| **Sitemkarî** | (n.I.raê) Zorî. Xurtî. |
| **Sitemlêkirin** | (k.jn.l.mê) Weke zorî li kes yan gelekî bi hêt kirin.Xurtîlêkirin.(K) bn: Kirin. |
| **Sitemlêkirî** | (hk.I.cewa) Gel, yan kesê zorî lê hatî kirin. Brx Sitemkar. |
| **Sitî** | (n.x.mê) I. Peyveke jibo rêzgirtina jinan bi kar di hêt. Xanim. Xatûn. 2. Navê jinane. *çîroka kêzê* :Sitîyê _imik reqreqîyê ib keyf û_şadî dê kîve çîyê?. |
| **Sitran** | (n.x.mê) Stiran. Lavje. |

| | |
|---|---|
| **Sitranbêj** | (kam.I.dn) Lavjebêj. |
| **Sitrangotin** | (k.jn.I.raê) Stirîn. Lavjegotin. |
| **Sitûn** | (n.x.mê) Stûn. |
| **Sivande** | (hk.cih,n.x.mê) Lêva bi serve hatî ya dora banî, ji şivan yan çîmentoyê hatîye çêkirin jibo paristina dîwaran dako verêja ava baran û berfan xirab neke. Serbênek. |
| **Sivandok** | (n.dar.mê) *balinde* Corekê çûçikane li bin sivandeyên xanîyan hêlînên xwe di kin. Sivyank. Kawanî. |
| **Sivik** | (hk.x.çew)a 1 . Ne giran.2. Sade. |
| **Sivikatî** | (hn.dar.çewa) Bê rûmetî. Bê bihayî. |
| **Sivikbûn** | (k.jn.I.mê) Weke tişt sivik di be.Li ber çavan bê rûmetbûn.. :Mirov di avê de sivik di be. (K) bn : Bûn. |
| **Sivild** | (hk.dar.çewa) Sivikatî. |
| **Sivikkirin** | (k.jn.I.mê) Barekî, tiştekî sivik bi kî. Xwe bê biha bi kî. (K) bn: Kirin. |
| **Siyî** | (n.x.mê) Tîvkilkê genim, ceh nîsk û htd. Pîşkê dexlî. |
| | 622 |
| **Sivîng** | (n.x.mê) Sivande. |
| **Sivnik** | (n.dar.mê) Gêzik. |
| **Sivore** | (n.x.nêr) candar Candarekê şîrdere, biçûke li ser kevir û daran di jît, xwarina wî gûz û berîne. Pend : Sivore sivkê darê, ji vê darê çû wê darê [str,gelêrî] Pend : Sivore û ber û minên xwe:ang Herkes û karînên xwe. |
| **Siwar** | (n.x.dz) 1 . Kesê li pişta dewaran yan li tirorabêlan siwar di bit. Siyar. 2. Navê raêrane. Brx Peya. |
| **Siwarbûn** | (k.jn.I.raê) Siyarbûn. |
| **Siwarî** | (hn.dar.çewa) Siyarî. |
| **Siwarkirin** | (k.jn.I.raê) Siyarkirin. |
| **Sixirk** | (n.dar.raê) Avahîyeke dîwarên wî ji kêteyan û serban bi qerera û levenî di hêt ranan, jibo têxistina alîkên giyandaran raifa jê di hêt wergirtin. |
| **Sixte** | (n.x.wê) Kar yan tiştê ne rewa. Xapandin. |
| **Sixteçî** | (kara,rd.dar.çewa) Mirovê karê sixte di ket. Xapînok. |
| **Sixtekirin** | (k.jn.I.raê) Mirovê sixteyan di ke. Xelkî di xapîne. (K) bn : Kirin. |
| **Sivabend** | (n.dar.nêr) I. Navê yek ji du qehremanên dastana [xec û siyabend] e.2. Navê raêrane. |
| **Siyamend** | (n.dar.nêr) Siyabend. |
| **Sivar** | (rd.x.çewa) bn: Siwar. Pend :Siyarê xelkî herê peyaye; ang pîşta xwe bi biyanîyan qayîm neke. Pend :Siyarê keran na gehe tu deran. Pend :Siyar ta ne kevit na bit siyar.ang; bi xebar û mandîbûnê rairov di gehit arraancan. |
| **Siyaset** | (n.biyan.xraê) Ramyarî. |
| **Siyasetvan** | (karn.dar.dn) Şareza di warê siyasetê da. Ramyarîvan. |
| **Siza** | (n.x.nêr) Hemberî her gunehekî yan karek ne dirist siza heye. Tola qanûnî. :Jiber ko dizî kir, sizayê wî heft mehan di girtîgehê da dê bi mînit. |

| | |
|---|---|
| | 623 |
| **Sizadan** | (k.jn.I.mê) Siza wergirtin ji kesê şaşîyekê di ke. (K) bn:Dan. |
| **Sizakirin** | (k.jn.I.raê) Sizadan. |
| **Sî l** | (hk.cih,n.x.nê) Kujîyê derve yê xanî. Tî . |
| **Sî 2** | (hijn.çend) Hijara 30. |
| **Sî 3** | (n.x.mê) Sîber. Sih.:Li bin siya darê nivist. |
| **Sî 4** | (n.x.raê) *endamê leş can* Siha nav singê giyandaran. |
| **Sîber** | (n.x.raê) I . Cihê hetava rojê yan ronahî lê ne dit jiber berbendek di kevit ber rûyê wê. Sîtavk. 2. Navê jinane. |
| **Sîbergirtin** | (k.jn.I.raê) Wekî roj ber bi ava ve di çit, li hin cihan sîber raişe peyda di be. |
| **Sîberkirin** | (k.jn.I.raê) Dema dar xerala xwe di girin ta û belgên wê tarî di bin sîbera wê xweş di be. |
| **Sîç** | (n.x.raê) Binas.guneh. Sûç |
| **Sîçbar** | (hk.dar.çewa) Binaskar.Gunehbar. |
| **Sîçbarkirin** | (k.jn.l.mê) Gunehek êxistine ser stoyê yekî.Gunehbarkirin. Binaskarkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Sîdekan** | (hk.cih,cugim) Devereke li Kurdistana Iraqê. |
| **Sîh 1** | (n.x.mê) ieş,can Hedamê henasedana candaran. Sih. |
| **Sîh 2** | (hijn.çend ) Hijmara 30. |
| **Sîh 3** | (n.x.raê) Sîber. |
| **Sîhem** | (hijn.rêz.çend) Ya,yê, yên sîhê. |
| **Sîhemîn** | (hijn.rêz.çend) Sîhem. |
| **Sîhhizar** | (hijn.I.çend) Hijmara 30,000. |
| **Sîhmilyon** | (hijn.l.çend) 30,000,000.30 milyon. |
| **Sîk** | (hk.cih,n.x.mê) Cihê kirîn û firotinê.Bazar. |
| **Sîkav** | (n.l.raê) candar Kirim ê berfê. Kirmikê befrê. |
| | 624 |
| **Sîma** | (n.x.mê) Serûçav.Rû. |
| **Sîme** | (n.x.nê) l.Tan yan perjanê asinî yê dir û bi kelem jibo paraztina zevî û erdan di hêt bi kar înan.2. Davên naylon yan kanzayî di nav perokî da. |
| **Sîmekirin** | (k.jnlraê) I .Bi sîmê pejandkirina cihekî. 2.Davên naylon yan kanzayî di nav perokî da. |
| **Sîmerx** | (ndar.raê) candar Core balindek evsaneyî ye di çîrokan da hatîye, mirov li ser pi_ta wî siyar di bûn, bo ceng û veguhastinê bi kar di anîn. |
| **Sînahî** | (ndar.mê) Dîtina tiştî wek sîberek yan pêjinekê. Bînahî. |
| **Sînayî** | (n.dar.raê) bn :Sînahî. |
| **Sînem** | (n.x.mê) *gul* Corekê gulane li çîyayên Kurdistanê hene; ango çavgir. 2. Navê jinane. |
| **Sîpan** | (hk.cih,devera) I Devereke[çîya] li Kurdistana baktir.2. Navek kurdî du zayende. |
| **Sînç** | (hk.cih,devern) Devereke li Kurdistana başûr-Akrê. |
| **Sîpel** | (n.dar.mê) 1 . Pivdankeke di nav zikê masîyan da. 2. Sîlav.3. Navêjinane. |

| | |
|---|---|
| **Sîqal** | (n x mê) 1. Core keresteyekê civire, mirov ronahîyê têra di bfnit. 2. Lûlikên qerisê li sirên zivistanan bi kevr û banan da şor di bin. Şape. |
| **Sîr l** | (n.x.mê) giya Giyayeke serik û belgên wî jibo xwarinê mifa jê di hêt wergirtin, bêhneka gemar jê peyda di bit. |
| **Sîr 2** | (hk.x.çewa) Tameka taybete, wek tama xwê. |
| **Sîratî** | (n.dar.raê) Tama sîr. Tama xwê. Savareka xwe_ bû, lê sîratîya wê ya zêde bû. |
| **Sîrbûn** | (k.in.l.raê) Dema xwêya zadî gelek be, dê xwarin sîr be.: Zad bi destê wê herdem sîr di bit. *Pend* :Girara du kabanîyan sîr di be yan bê xwê di be. |
| **Sîret** | (n.x.nêr) Alek. Rû. |
| | 625 |
| **Sîrfisk** | (n.I.mê) giya Corek sîrên kûvî û bêhin gemarin. |
| **Sîrik** | (n.dar.mê) giya Corekê sîrên kûvîne di biçûkin. |
| **Sîrî** | (n.dar.mê) Sîrati. |
| **Sîrkirin** | (k.jn.I.mê) Dema xwê di xin nav xwarinekê. (K) bn: Kirin. |
| **Sîrkirî** | (hk.I.çewa) Zadê xwê tê kirî. : Giyayê sîrkirî. :Goştê sîrkirî. |
| **Sîs** | (hn.x.çewa) Tiştê tava rojê lê nedayî û sipîtaleye. Kej. |
| **Sîsark** | (n.x.dz) *balinde* Corek ji teyrên nêçîrê ye. |
| **Sîsbûn** | (k.jn.I.raê) Mirov yan tiştê li cihek tarî, rengê wî sîs di bit(K) bn: Bûn. |
| **Sîseban** | (na,dar.raê) Navê dastaneka evsaneyî ye. Borê reş. |
| **Sîsê** | (hn.gaz.raê) Navkirin û naznave, jibo keça sîs di hêt gotin. |
| **Sîsirk** | (n.x.mê) *candar kêzik* Core kêzikeke di nav malan da li ser bermayîyên zadê di jîn. |
| **Sîsk** | (n.x.mê) *tewal* Balindekê hêkkere li Kudistanê mi_eye. |
| **Sîskirin** | (k.jn.I.raê) Sipîtalekirin. Kejkirin. |
| **Sîso** | (hn.hd,gaz.nêr) Naznavek gazîkirinê ye jibo mêrê sîs. |
| **Sîstem** | (n.cîh) Awayê rêkûpêk jibo karkirin, darijtin û avakirinê. :Sîstema xandinê li Kurdistanê cuda ji ya welatên din. |
| **Sîtav** | (n.I.mê) Sîtavk. |
| **Sîtavk** | (nl.mê) Dema ronîya rojê yan her yeka din, li le_ekî di de, mînaka wî dirist di be.Sîber.*Pend* :Ji sîtavka xwe di tirse. Ang; kesê tirsonek herdem tirs di dilê wî daye. |
| **Sîte** | (n.x.mê) Tora masîgirtinê. |
| **Sîtil** | (n.x.mê) Setil. |
| **Sîvan** | (n.I.raê) Sîhwaneya mirov li hindav serê xwe di gire, da xwe ji baranê bi parêze. |
| **Sîvanok** | (n.I.mê) *gul* Corekê gulane, gelek reng hene, wek, sor, sipî,ser, mor, û têkel. |
| **Sîvîl** | (n.cîh) Welatî. Bajêrvanî. |
| **Sîvok** | (n.dar.mê) Cihê êvitî yan belbûyî li ser canê mirovî ji egera lêdana gurzekî,bêy ko bi _ikêt. |
| **Sîxme** | (n.x.nêr) Darikê tîj. Kelem. |

| | |
|---|---|
| | 626 |
| **Sîxur** | (n.x.nê) 1. *giyanewer* Candarekê kûvîye, _îrdere le_ê wî bi strî ye.2. Nî_ana xwefirotinê ye. Dardestê dujminî. |
| **Sofî** | (nx.dz) Mirovên xudênas. |
| **Sojtin** | (k.jn.x.mê) 1.Dema agir bi ti_tekî di kevit. 5ewitîn. 2.Jan. Ê_an. *Pend* :Sotin, nahêt gotin.ang: mirov nikarit ya dilê xwe bêjit.: (K) Bdn: ez di sojim em di sojîn, tu di sojî hûn di sojin, ew di soje[…it] ewan di sojin. Pr :Dê[bi] sojim, sojîn, sojî sojin, sojit[…je]. Bdb : di sotim, di sotîn, di sotî di sotin, di sot, di sotin. Db,dûr : sotibûm,em sojtibûyn,ew sojtibû …tu sojtibûy, hûn, ewan sojtibûn. (F): bi soje, bi sojin. |
| **Sol** | (n.x.raê) Pêlav. |
| **Solbend** | (pîşn.dar.dn) I. Kesê pêlavan di ke. 2. bn :NaIbend. |
| **Solbendî** | (kam.raê) Nalbendî. |
| **Solker** | (pîşn.dar.dn) Solbend. Pend :Solker di pêxasin, cilker di bê kirasin. |
| **Solîn** | (n.x.raê) 1 . Coya avê ya di bin axê ra hatî çêkirin li bin kolan mal û cadan. 2. Cihê çandin û firotina gulan. Gulistan. |
| **Sond** | (n.x.raê) Soza mirov bi ti_tê pîroz mîna kitêbên pîroz, gora nemiran, welat û htd, di de, ko rastgo û disoj be. |
| **Sonddan** | (k.jn.I.mê) bn : Sondxwarin. |
| **Sondxwandin** | (k.in.l.mê) Sonxwarin. |
| **Sondxwarin** | (k.jn.I.mê) Wekî mirov hember kesek, destek, dadgeh, berpirs û htd sondê di de ko di kar gotin û kiryarên xweda dilsoj be. (K) bn :Xwarin. |
| **Soea** | (n.x.nêr) Hêzeka ji bireka çekdarên fermî pêkhatîye. Le_ker. :Sopayê êk, dû, .. û htd. |
| **Sopageh** | (hk.cih,n.dar.raê) Baregayê sopayî. |
| **Sope** | (n.x.raê) Amaneke daran yan sotekên din tê di xin jibo xwe gerimkirinê li demên sar. Sopeya: daran, gazê, xazê, karebê û htd. |
| **Sor** | (hk.x.çewa) Rengê xwînê. |
| **Soran** | (hk,cih.ndar.nêr) 1. Devera soran başûrê Kurdistanê. 2. Navê raêrane. |
| **Soranî** | (n.dar.raê) Zar yan devoka xelik ê deverên soran lê di mînin. |
| | 627 |
| **Sorav** | (n.l.mê) *ciwankirin* 1.Ava hatîye sorkirin. 2. Dermanê sorkirina rû yan lêvan yê jinan. |
| **Sorbûn** | (k.jn.l.raê) l.Rengê mirovî ji germê, hêrsbûnê sor di be. 2. Rengê sor li tiştekî bi hêt dan. (K) bn : Bûn. |
| **Sorelêv** | (n.I.pir) Lêvên sor. |
| **Soreta** | (n.I.pir) derd Sorik. |
| **Soretarî** | (hk.I.çewa) Rengê sor ê tarî. |
| **Sorevekirî** | (hk.l.çewa) Rengê sorê vekirî. |
| **Sorewêl** | (n.dar.dn) *tewal* Teyrekê avîyê, geroke, reng sore. Flamingo. |

| | |
|---|---|
| **Sorê** | (hn.hd,gaz.dar.mê) Naznav û gazîkirinajibo jina sor. |
| **Sorgul** | (n.I.raê) I. Gula sor. Pend :Sorgul di bê stirî nabin.2. Navê jinane. |
| **Sorik** | (n.dar.pir) *derd* Derdeke zarok pê di kevin, pirsikên sor li ser le_ê wan peyda di bin û ta di hênê. Soreta. |
| **Soring** | (hn.dar.çewa, n.dar.raê) 1. Rengê gorîya agirî. 2. Tarîgewirk. |
| **Sorîçk** | (n.dar.raê) can candarzanî Borîya ji devî dest pê di kit û li gedê bi daomahî di hêt ya zad têra derbaz di bit. |
| **Sorkelem** | (n.I.raê) giya Kelemîya sor. |
| | 628 |
| **Sorkirin** | (k.jn.I.mê) 1. Rengkirina ti_tî bi rengê sor. 2. Qelandina zadî di nav rwînî da.(K) bn: kirin. |
| **Soro** | (hngaz.dar.nêr) Naznav û gazînavê mêrê sor. |
| **Soryaz** | (n.dar.raê) giya Giyayek xwarinê, kûvîye li zozanan hişîn di be. |
| **Sotin** | (k.jn.x.raê) bn :Sojtin. |
| **Soxte** | (n.x.dn) Qutabî. Xwendkar. |
| **Soz** | (n.x.mê) Peyman. |
| **Sozan** | (n.dar.mê) Navê keçane. |
| **Sozdan** | (k.jn.I.raê) Peymandan. :Em sozê di din ko destan ji xebatê ber na din. (K) bn: Dan. |
| **Sozgirtin** | (k.jn.I.raê) Sozdan. |
| **Sozkirin** | (k.jn.I.mê) Sozdan. |
| **Sozsitandin** | (k.jn.I.mê) Sozdan. |
| **Spîlik** | (na,hk,cih,dar.raê) 1. can Sipîyatîyê çavî. 2. Sipîyatîyê hêkê. 3. Navê deverekêye li Kurdistana Iraqê. |
| **Spîyav** | (n.l.mê) *ciwankarî* Dermanek arik, yan hevîre, jin di rûyên xwe di din jibo ciwankarîyê. |
| **Stewir** | (hk.x.çewa) Candarê karîna bergirtinê nîne. Xirş. |
| **Stewirbûn** | (k.jn.Imê) Xirşbûn. |
| **Stewirkirin** | (k.in.I.raê) Ji bergirtinê xistin. Xirşkirin. |
| **Stêng** | (n.x.dz) candar adt Caudarek jehirdarc, baldare, rengê wê sore kunêd xwe di ax û keviran da di kit, raêşhingivan di xwe u ziyanê di gehîne. |
| | 629 |
| **Stêr** | (n.x.mê) Tenê li esmanan yên bi şev xuya di bin. Erd. |
| **Stêrik I** | (n.dar.mê) Stêr. |
| **Stêrik 2** | (n.dar.mê) Guhkên serê tivengan ko jibo sêregirtinê mirov têra di nêre armanca xwe. |
| **Stêrikgirtin** | Stêrklêgirtin (k.jn.l.mê) Nî_angirtin dema mirov di stêrika tivengê ra di nêrit nîşanê. Stêrika xwe lê girt. (K) bn: Girtin. |
| **Stêrk** | (n.x.mê) Kepirkeke di nav malê da dirist di kin, xwarin û pertalan li ser di danin. |
| **Stêrnas** | ( pîşn.I dz) I . Zana warê zanîna li ser stêran. 2. Kesê bi rêya stêran pêşbînîya btiyeran di ket. |

| | |
|---|---|
| **Stêrnasî** | (kam.I.mê) 1. Zanîna bizav, pêkhatin, dûrî û htd li bareyê stêran.2. Zanîna pêşbînîkirina bûyerên li paşejorê rû di din. |
| **Stêrok** | (n.dar.raê) Setelayt. |
| **Stêrzan** | (pîşn.dar.dz) Stêrnas. |
| **Stêrzanî** | (karn.I.mê) Stêrnsî. |
| **Stiran** | (n.x.raê) Deqeke mirov bi dengê xwe bi awaz û selîqe di bêje. Deng. |
| **Stiranbêj** | (pîşn.l.dz) kesê stiranan di bêjit. Honermendê karê wî gotina stirana ye. Dengbêj. |
| **Stirangotin** | (k.jn.I.raê) Weke mirov di stire. Stiranan di bêje.<br>Dengan di bêje. (K) bn: Gotin. |
| **Stirîn** | (k.jn.x.mê) Stirangotin. (K) bdn :Ez di stirim, em di sirîn, tu di stirî, hûn di stirin, ew di stire ewan di stirin. Pr:dê[bi]+bdn<br>Bdb : di stirîra di stirîn, di stirî, di stirîn, di stirî. Db,dûr : ez<br>stirîbtira em stirîbûyn, tu stirîbûy hûn,ewan stirîbûn, ew stirîbû<br>(F) :bi stire, bi stirin. |
| **Sto** | (n.x.nêr) can Cihê di kevit navbera ser û navmilan, ko ser î ra di girit. |
| **Stobend** | (n.dar.mê) Bendikê mirov di ket soyê xwe liser sentor û pentoran. Stovan. Girafît. |
| **Stodirêj** | (n.l.dn) candar Giyandarekê şîrdere, giyaxore, stoyê wî dirêje. |
| | Stodirêj |
| **Stovan** | (n.dar.mê) 1.Ristik.2. Stobend. :Seydayî sentor û pentorû  pentorên xwe li xwe kirin û stovank li stoyê xwe girêda. |
| | Stovan |
| **Stoxwar** | (hn.I.çewa) Hejar. Bendewar. |
| **Strî** | (n.x.nêr) Kelem. Dasî. |
| **Stûr** | (hk.x.çewa) Ne zirav. Stwîr. : Darê stûr. Marê stûr. Werîsê stûr. |
| **Stûrbûn** | (k.jn.l.raê) Dema tişt stûr di be, mirov qelew di be. Qelewbûn. Pirbûn. |
| **Stûrî** | (n.dar.mê) Pirî. Qelewî. Zorî. |
| **Stûrkirin** | (k.jn.I.mê) Qelewkirin. Mezinkirin. Qebekirin. Liserêk danan. |
| **Subat** | (hk.dem) Meha şubatê. |
| **Suhbet** | (n.x.mê) 1 .Danûstandin. Axivtin. 2. Gotinek ne rijd.Tirane. |
| **Suhbetkirin** | (k.jn.I.mê) Danûsitandin. Axivtin. |
| **Sulêmanî** | (hk.cih,cugim.cih) Bajêreke li Kurdsitana Iraqê. |
| **Supas** | (n.x.mê) Bersiveke, gotineke, mebest jê pêxweşbûna mirovîye hember kar yan gotina kesekî. Memnûn. |
| **Supasdar** | (hn,hk.dar.çewa) Mirovê bi karekî  xweş û supasîyan jê ra di bêje Mmirov supasî alîyek yan kesekî  bit. Mirov bi karekî yê qayîl bit. |
| **Supasî** | (n.x.mê) Derbirîna qayîlbûnê yan keyf pêhatina mirovî  jibo karekî yan gotina kesekî. Memnûnî. |
| **Supasîkirin** | (k.jn.I.mê) Dema mirov supasîya yekî bi ke. :Ez supasî te di kim, ko te alîkarîya min kir. (K) bn : Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Supaskirin** | (k.jn.I.mê) Supasîkirin.: Ji hewe supas diki, hûn tevî bernameya me bûn. .(K) bn: Kirin |
| **Suxre** | (n.x.mê) Karê jibo veguhastina mita, fêqî yan her kelûpelek bit, ko gundî bi dewarên xweve bi vî karî ra di bin jibo mala axayî yan alîyên din, hin caran bêy vîyana xelkî û bi kotekîye. Alîkarîya malmezinan. Yan hikmetan bi zorî. Zibare.Pend :Suxreya hêstiran bû, rûvî di revî. |
| **Suxrekirin** | (k.jn.I.mê) Bi karê suxrê rabûn. (K) bn: Kirin. |
| **Suxte** | (n.x.dz) bn:Soxte. |
| **Sûç** | (n.x.mê) Binas. |
| **Sûçbar** | (hk.dar.çewa) Gunehbar. Binaskar. |
| **Sûd** | (n.x.mê) Mifa. |
| **Sûddar** | (rd.I.çewa) Mifadar. |
| **Sûddîtin** | (k.jn.I.mê) Mifadîtin. Sûdjêdîtin. Mifajêdîtin.(K) : Dîtin. |
| **Sûdwergirtin** | (k.jn.I.mê) Mifawergirtin (K) bn:Wergirtin. |
| **Sûk** | (hk.cih,n.x.mê) Cihê kirînûfirotinê. Bazar. |
| **Sûl** | (hn.x.raê) Hilû. Lûs. |
| **Sûlav** | (hk.cih,n.I.mê) Sîlav. |
| **Sûret** | (n.x.nêr) bn :Sîret. |
| **Sûrî** | (nejn) Xelik yan pertalên ji welatê Sûrya. |
| **Sûrya** | (hk.cih,weln) Welatek Komarî ye, ji ereb û kurd an pêkhatî. |
| **Sûtan** | (jn.x.mê) Sojtin. |
| **Sûtandin** | (k.jn.x.mê) Şewitandin. Sojtin. |
| **Sûz** | (nx.mê) 1.Peyman. 2. Dilînî. |
| **Sûzan** | (ndar.dz) Navê keçane. |
| **Sûzdan** | (k.jn.l.mê) Peymandan.: Sûz bi de ko tu çi caran viran ne key. (K) bn: Dan |
| **Sûzdar** | (rd.çewa) Xwedî sûz. Peymandar. Br$^x$ Bêsûz. |
| **Swêd** | (hk.cih,weln) Welatek ewropayîye. |
| **Swêdî** | (netewn) 1. Hilgirê nasnameya welatê Swêd. 2. Pertalên ji Swêd. |
| **Swîr** | (hk.x.çewa)Tama xwê. Xwarina sîr ;ang xwarina zêde xwê. |
| **Swîratî** | (ndar.mê) Tama swîr.swîrî. |
| **Swîrbûn** | (k.jn.I.mê) Heger xwêya xwarinê zê be tama wê sîr di be. (K) bn : Bûn. |
| **Swîrkirin** | (k.jn.l.mê) Xwê pêwerkirin. (K) bn: kirin. |
| **Swîsra** | (hk.cih,welatn) Weltek ewropayî ye. |
| **Swîsrayî** | (netewn) 1. Helgirê nasnameya welatê Swîsra.2. Pertalên ji Swîsra. |

# Ş

| | |
|---|---|
| **Ş** | (şe) Pîta bîst û sê ji abeya kurdî. |
| **Şa** | 1 (pîşn.x.dn, hn.x.çewa) 1.Rêberê welatekîye ko awayê deshelata wî paşyetî bit. Şah. Kiral. 2. Bijare. Serpişk.Baş. Mezin. Zebelah. |
| **Şa** | 2 (rd.x.çewa) Keyf. Xweşî. |
| **Şabad** | (hk.cih.n.I) 1.Cihê roniştina şahî. Wargehê şahî. Şahnişîn.2. Navê jinaye. |
| **Şabal** | (n.I.nêr) Şaper.Şabalên çûçikê şikestin. |
| **Şabaş** | (n.I.mê) 1.Başîyek mezin. Qencîyek zil. 2. Dîyarîya stiranbêj yan, mûzîkvan û zirnabêjan li dema şahî û govendan. |
| **Şabaz** | (n.dar.dz) balinde Şahê teyrên. Baz. 2.Navê mêrane. |
| **Şabelot** | (n.I.mê) dar Şahbelot. |
| **Şabo** | (n.I.nêr) tewal Balindeyekê rinde, çavên wî di ciwan û mezinin. Bom. |
| **Şabom** | (n.I.dz) Şabo. |
| **Şabûn** | (k.jn.I.mê) Keyxweşbûn. Dilxweşbûn. :Bi hatina babê ew pir şa di be. |
| **Şabûnî** | (n.l.mê) Şahî. Seyf. |
| **Şaciwan** | (n.l.mê) Keç yan jina ji hemûyan ciwantir di hêt hilbijartin. |
| **Şad** | (hn.x.çewa) 1.Bi keyf. Bi gêwil. Xweş. 2. Navê mêrane. |
| **Şadbûn** | (k.jn.l.mê) Kêfxweşbûn. Dilvebûn.(K) bn: Bûn. |
| **Şademar** | (n.I.mê) Şahdemar. |
| **Şadiman** | (rd.I.çewa) Dilfireh. Şabûnî. |
| **Şadimanî** | (n.I.mê) Dilfirehî. Keyf. |
| **Şadirvan** | (n.dar.mê) Melevangeh. |
| **Şadî** | (n.x.raê) Xewşî. Kêf |
| **Şadkirin** | (k.jn.I.mê) Kêfxweşkirin. Bi wê biryarê te ez şad kirim. |
| **Şadrewan** | (n.dar.mê) Melevangeh. |
| **Şafir** | (n.x.raê) giya Giyayekê dême, davên wî di dirêjin, kew û sîsk hêlînên xwe li bin çê di kin. |
| **Şag** | (n.x.mê) Şak. |
| **Şagenim** | (n.I.nêr) 1. Genimê bijare 2. Genmok. Genimşa. |
| | Şagenim |
| **Şagird** | (n.I.dz) 1. Kesê liber destê hostayekî karekî di ke. Berdestik. 2. Xwendkar. Qutabî. |
| **Şagul** | (hn,pesin,n çewa) 1. Ciwantirîn gul. Gula mezin.2 Navê keçane. |
| **Şah** | (pîşn.x.dn) Paşa.Şa. |
| **Şahane** | (rd.dar.çewa) Bijare. Serpişk. |
| **Şahbaz** | (n.I.dn) 1. Teyrê baz. Şahê teyra.2. Navê mêrane. |
| **Şahbelot** | (n.I.mê) dar 1.Core darekce bi xemil û mezine, kulîlkên pîvazî yan sipî di det. 2. Berê dara şahbelotêye, mîna gûzane, bi kêrê xwarina mirov û candaran di hên. |
| **Şahdemar** | (n.l.mê) Demarên serekî yên ji mejî di stoyî ra derbaz di bin bo leşê candaran. |
| **Şaheng** | (pîşn.l.mê) Şaha mêşhingivan. Şaha mêşa hingvînî. |

| | |
|---|---|
| **Şahî** | (n.x.mê) Şadî. Keyf. Govend. |
| **Şahîn** | (n.dar.dz) balinde 1 . Teyrê kelexan. 2.Navê mêrane. |
| | Şahîn |
| **Şahmar** | (n.I.dz) Şahê maran. Marê kobra. |
| | Şahmar |
| **Şahnazî** | (n.I.mê) Serbilindî. Serferazî.: Ji mera şahnazîye, kurd rêzê li mêvanên biyanî di girin. |
| **Şahnazîkirin** | (k.jn.gl.mê) Mirovê karekî dilxweş û serferaz bi be.: Ew şahnazîyê bi keça xwe dike ko yekem derçû liser xandingeha xwe. |
| **Şaho** | (n.dar.nêr) balinde 1.Corek teyrane.2. Navê mêrane. |
| **Şahrê** | (n.I.raê) Şarê. |
| **Şahsiwar** | (kam.I) Şahê siwaran. Serokê siwaran. Sersiwar. Şasiwar. |
| **Şahzade** | (kam.I) Pisê yan dota şahan. Paşa. |
| **Şajin** | (kam..I.raê) Şaha jin. :Jina kiral. |
| **Şajinaciwanîyê** | (n.I.mê) Şaciwan. |
| **Şak** | (n.x.mê) Bistîkên hin daran wek mêw, xwe di daran di alînin dako tayên wê xwe li ser bi girin û bilind bibin. |
| **Şakhavêtin** | (k.jn.I.mê) Hişînkatîyê bi hêz û xemil di kevit û şakakan di havêje. (K) bn: Havêtin. |
| **Şakirin** | (k.jn.I.mê) Dilxweşkirin. : Te dilê min şakir bi wê mizgînîyê. |
| **Şal** | (n.x.mê) 1 .Şîtika ji hirîyê yan mûyên kewalan hatî çêkirin , mêr û jin li pişta xwe di kin. 2. Şel. |
| **Şalok** | (n.dar.mê) Daseka devê wê wek kerê heyvêye, bo dirûna giya,genim ceh û htd bi kar di hînin. Kêlendî. |
| **Şalûl** | (n.x.nêr) balinde Corek balineyê denxweşe. Bilbil. |
| **Şalûşepik** | (n.I.pir) Şelûşepik. |
| **Şalyar** | (kam.dar. dz) Wezîr. :Şalyarê derve. :Şalyara ragehandin. :Şalyarê berevanîyê. |
| **Şalyarî** | (n.dar.mê) Wezaret. |
| **Şam** | (hk.cih.cugr.n.x) Paytextê welatê Sûryê. Dîmeşq. Pend :Şam şekire, welat şirîntire. |
| **Şamirîşk** | (n.l.dm) candar Dîkileşam. Elok. Mirîşkeşa. |
| | Şamirîşk |
| **Şamî** | (n.x.mê,hk.çewa) 1 . fêqî Corek gundorane. 2. Mirovê pora wî weryaye.Keçel. Hewês.3. Şamirîşk. Elok. |
| **Şampo** | (n.biyan) Core sabûneka rone, mirov ser û giyanê xwe pê di şût. |
| **Şan** | (n.x.mê) can Mil. |
| **Şand** | (n.x.mê) Kesek yan çend kes bi nûnerîya dezgeh yan welatekî seredana alî yan jî welatekê din bi ken. :Şanda çandî, ramyarî, aborî û htd. Hinartî. |
| **Şandin** | (k.jn.x.mê) Hinartin. Rêkirin. : Bavê wî nameyek jêra şand. (K) Bdn: Ez di şînim em di şînîn, tu di şînî hûn di şînin, ew di şîne[ ...it] ewan di şînin. Pr : Dê[bi] şînim, şînîn, şînî, şînin, şînit[ ...ne], şînin, Bdb :di şand, di şandin. Db,dûr : şandibû, ... bûn. (F): Bi şîne, bi şînin. |

| | |
|---|---|
| **Şandî** | (hk.dar.çewa) Hatî şandin. Bi rê kirî. Hinartî. |
| **Şane** | (n.x.mê) can Cihe ji xaneyên biçûk pêkhatîye. :Şaneyên leşê giyandaran. :Mêşhingiv hingiv û kirmên xwe di şaneyan da di dane. |
| **Şanezerk** | (n.l.mê) candar adî Zirkêtk. :Şanezerkê şaneya xwe bi sivandê ve çêkir. |
| **Şanik** | (n.dar.mê) Nîşan. Xal. |
| **Şanişîn** | (hk.cih.I.mê) Cihê bêhinvedan û rûniştina şahî .Wargehê şahî.Welatê paşayetî. |
| **Şanî** | (n.x.mê) Nîşan. |
| **Şanîdan** | (k.jn.I.mê) Nîşadan. :Ji kerema xwe di karî bingehê polîsan şanî min bi dî ?.(K) bn :Dan. |
| **Şanîkirin** | (k.jn.I.mê) Nîşêkirin. Nîşadan. |
| **Şano** | (hk.cih,n.x.nêr) Cihekê nemazeye jibo pêşkêşkirina zarvekirinê hember temaşevanan. |
| **Şanoger** | (pîşn.dar.dz) Kesê şanoyê pêşkêş di ke.Zarvekerê şanoyê. Şanovan. |
| **Şanogerî** | (kam.dar.raê) Karê şanoyê. |
| **Şanovan** | (pîşn.dar.dz) Şanoger. |
| **Şanovanî** | (kam.dar.mê) Şanogerî. |
| **Şanşanok** | (n.l.mê) Xîçikên di ber yek ra kêşayîn ko di listina zarokan da di hên kêşan. |
| **Şanşanokanê** | (nl.dar.mê) yarî Lîstineke zarok di bin du bir, yek li ber makê di mîne ya din di çit dûr û veşartî, xîçikan li ser ber, dîwar, erd û htd, di kêşin. Bira li ber makê lê di gerin û şanşanokên wan xera di kin, heger çi neman, dê bira din kevit ber makê, lê hindî mayîn dê bin xal li ser ya bermakê û dê her li ber mînit. |
| **Şape** | (n.x.mê) Sîqal. Lûlîyên bestiyê. |
| **Şaper** | (n.I.nêr) Perê mezin yê balindeyan, ji gelek peran pêk di hêt. Şabal. |
| **Şapik** | (n.x.nêr) Şepik. |
| **Şar** | (hk.cih,cugrn.x.nêr) Bajêr. Şehir. |
| **Şarandin** | (k.jn.x.mê) Gerimkirin. Dijwarkirin. Arandin. Azirandin. :Wî civata şarndî; bi rewş êxistî bi axivtin û suhbetên xweş. (K) Bdn :Ez di şarînim em di şarînîn, tu di şarînî hûn di şarînin, ew di şarîne[ . . .it] ewan di şarînin.. Pr: dê [bi] şarînim, şarînîn, şarînî, şarînin, şarînit[ ...ne], şarînin. Bdb:di şarand, di şarandin. Db,dûr :şarandibû, ... bûn. (F): Bi şarîne, bi şarînin |
| **Şarbajêr** | (hk.cih,cugm.l.mê) Bajêreke li Kurdistana Iraqê. |
| **Şaredar** | (pîşn.dar.dn) Serokê bajêrî. Parêzgar. |
| **Şaredarî** | (n.dar.mê) Parêzgeh. |
| **Şaredê** | (hk.cih,cugir.n.l.) Bajêrk. |
| **Şarestûn** | (n.l.mê) Cih, xanîyê bi stûnan hatîye ragirtin, dako pestan li ser dîwaran kêm bi be û ji herifînê bêt parêstin. |
| **Şarestûnkirin** | (k.jn.I.mê) Danana yan rêzkirina bireka stûnan li bin banê avahî.(K) bn: Kirin. |
| **Şarevan** | (pîşn.dar.dz) Bajêrvan. Parêzgar. |
| **Şarevanî** | (n.dar.mê) Bajêrvanî. |
| **Şareza** | (hn,hk.l.çewa) Mirovê şiyan û zanîn di warekî heye. Bispor. |
| **Şarezabûn** | (k.jn.I.mê) Mirov di karekî da pelewan bi bit. Zanabûn. Hînbûn. |
| **Şarezad** | (n.I.dz) Kur yan keça şaran. Xelkê bajaran. |

| | |
|---|---|
| **Şarezakirin** | (k.jn.l.mê) Fêrkirin. Hînkirin. |
| **Şarezayî** | (n.dar.mê) Zanîn. Pisporî. |
| **Şarê** | (hk.cih,n.I.mê) Rêya mezin ya galiske û tirobêl lê di çin.Cade. |
| **Şaristan** | (hk.cih,cugir.n) Cihekê bajarên wî nêzî hev. Bajêr. |
| **Şaristanî** | (n.I.mê) Pêşkeftina gelan ji alîyê teknolocî, honer,zanîn û çandê ve. |
| **Şarvan** | (n.dar.dz) Xelkê şaran . xelkê bajaran. Xudanê, berpirsê saharî. |
| **Şarvanî** | (n.dar.mê) Civata berpirs bi karên şarî.Bajêvanî. |
| **Şaryan** | (k.jn.x.mê) Kelbûn.Gerimbûn. Aryan. Xîz, erd, asin, ber û htd yê şaryay ;ang yê kelbûy. |
| **Şasiwar** | (n.I.dz) 1.Serokê siwaran. Sersiyar. 2. Navê mêrane. |
| **Şaş** | (hk.x.çewa) 1.Çewt. Ne dirist. 2. Kesê xwe ji bîr bi kit ji egera tirsê yan şermê. Şepirze. |
| **Şaşbûn** | (k.jn.I.mê) 1. Çewtbûn. Di serda çûn. Hatin xapandin. 2. Ageh ji xwe neman. Şepirzebûn. (K) bn: Bûn. |
| **Şaşik** | (n.dar.mê) Dersok. Cemedanî. Kevink. |
| **Şaşikgirêdan** | (k.jn.l.mê) Pêçana şaşikê û di serê xwe alandin. (K) bn: Girêdan. |
| **Şaşî** | (n.x.mê) 1 . Çewtî.2. Şepirzeyî. |
| **Şaşîkirin** | (k.jn.I.raê) Çewtîkirin. Serdaç û n. : Te şaşîyeka raezin kir Dema te dest ji xandinê berda. (K) bn: Kirin. |
| **Şaşkirin** | (k.jn.I.raê) Gêjkirin. Hêrkirin. : Ji min vebe, te ez şaşkirin.Xwe şaş neke dê şêy derbazbî. |
| **Şaşman** | (k.jn.l.mê) Weke mirov şaş di mîne. Hicmetîbûn.(K) bn:Man. |
| **Şaşûper** | (n.I.pir) Şaşika bi per û gîfik, mirov di kin serê xwe.:Şaş û perên raelayî. |
| **Şatir** | (n.x.dz) 1.Kesê kelûpel, nî_anîyên bûkan û nameyan di gehîne xwedîyên wan. Pîlik. eter. 2. Heval. Hevbend. |
| | |
| **Şavêr** | (hk.x.çewa) Parav. Çivêl. |
| **Şavêrî** | .(n.dar.raê) Paravî. Çivêlî. |
| **Şawîs** | (n.I.nêr) Navê raêrane. |
| **Şax** | (n.x.nêr,hk.cih) I . Hestiyê dirêj û xar û pêç di serê caneweran da nexasira kewalan. Qoç ; kelê bi şax, nêrîyê bi şax. 2. Ta . Çeq. Liq.3. Çiya. |
| **Şaxvan** | (n.dar.dz) I. Xwedîyê şaxan, çiyan. Çiyavan. 2. Navê kiç û xortan. |
| **Şaxur** | (hk.cih,n.dar.raê) Zinar. Kevir. Tat. |
| **Şayan** | (jn.x.mê) Şiyan.Hêjî. |
| **Şayî** | (n.x.raê) Şahî. |
| **Şazade** | (kam,n.I.dz) Ji xêzana şahan . kur yan keça şahan. |
| **Şazde** | (hijn.l.çend) Hijmara 16. 15 + 1= 16. |
| **Şazdehizar** | (hijn.l.çend) Hijmara 16,000. |
| **Şazdemilyon** | (hijn.I.çend) Hijmara 1 6000,000. |
| **Şe** | (n.x.nêr) Dark, lastikyan asineke , dindikên wî zirav û bi rex êkvene, mirov jibo hilî û peytkirina pora xwe bi kar di hîmn. |
| | 641 |

| | |
|---|---|
| **Şeb** | (n.x.mê) Keresteyekê reqe wek _ekirêyê, bê tame. Pend :.eb û şekir li nik ewan êkin.ang; li nik mirovên merd qesp û hesp mîna yekin. |
| **Şebeng** | (n.dar.mê) Rengên ji rengên serekî hatîne darijtin. Şeveng. |
| **Şeftalî** | (n.dar.mê) Xox. |
| **Şeh** | (n.x.nêr) Şe. |
| **Şehir** | (hk.cih.cugraa.raê) Şar. |
| **Şehîd** | (peyv,biyan.hn.çewa) Kesê di rêya dozeka rewa da canê xwe gorî dike. |
| **Şehîdbûn** | (k.jk.I.mê) Canê xwe gorî doza xwe kirin. |
| **Şehîdkeftin** | (k.jn.I.mê) Şehîd bûn. |
| **Şehîdkirin** | (k.jn.I.raê) Mirin di rêya rewa da. |
| **Şehnişîn** | ( û k.cih,n.I.raê) Eywana li ser banî. Balkon. |
| **Şehreza** | (hn.çewa) Şareza.Zana. |
| **Şehrezad** | (n.I.dz) Xelkê şehir. Kur yan keça bajaran. Bajêrî. Brx gundî. |
| **Şehristanî** | (n.I.raê) Şaristanî. |
| **Şek** | (rd.x.nêr, çewa) Qonaxeka jîyê pezê nêre. Beranê ji du salan raezintir. |
| **Şekal** | (n.dar.raê) 1 . Pêlava mirov dawîya wê li bin panîya pêyî di şikêne û di dide ser pê xwe. 2.Pêlav. |
| **Şekir** | (n.x.raê) Madeyekê toz yan kabikên şirîne , di kin nav çayê yan xwarinên din jibo şirînb û nê. : Ev çaye ya bê şekire. Pend :Heger hevalê te şekir be, heraîyê ne xwe. |
| **Şekirav** | (n.I.raê) Ava şekirkirî. Ava bi şekirê şirînkirî. |
| **Şekirdan** | (n.dar.raê) Araanê têkirina şekirê. |
| **Şekirin** | (k.jn.l.mê) Mirov pora xwe bi şeyî hilî û peyt di ke. Hil û kirina mû û hirî ya Kewalan.(K) bn : Kirin. Sekirk (n.dar.mê) Pirtên çêkirî yên rengîn ji şerkirê yên şirîn û xweş. |
| | 642 |
| **Şekirkirin** | (k.jn.l.raê) Şekir êxistine nav vexwarin yan zadekî. :Şekirê bi ke çayê. :Ev kada şekirkirî geleka xweşe. |
| **Şekirnok** | (n.I.raê) Şekirkeke nokeka qelandî di nav da ye. |
| **Şekok** | (n.x.raê) Hirmîka k û vî. Girsik. |
| **Şekrok** | (n.dar.mê) Şekirk. |
| **Şel** | (n.x.nêr) Parçeya binî ji cilên kurdî şel û şepikan. Şelwalê bergîzkan. |
| **Şelal** | (hk.çewa) Giya,darên ji hev dûr. Ne di berêk ra. Pora şelal ;ang pora dav kêm.. Brx bi Tov. |
| **Şelalbûn** | (k.jn.I.raê) Ji hev dû kevtina darûbaran.. Por mirovî di werit , şelal di bit. Genim hat çerandin şelal bû . |
| **Şelalkirin** | (k.jn.I.raê) Jiber êk înan der. |
| **Şelandin** | (k.jn.x.raê) Mirov êkî, raalekê yan gundekî bi şelînit. Ang; mal û diravên wî bi kotekî bi bit. Talankirin. Mirov xwe bi şelînit.ang; mirov cilên xwe yên karî danit û yên bêhinvedanê li ber xwe bi kit. (K) ben :ez di şelînim em di şelînîn, tu di şelînî hûn di şelînin, ew di şelîne[. . .it] ewan di şelînin. Pr: dê bi + bdn. Bdb: di şeland, di şelandin. Db,dtir: şelandibti, ... btin. (K) : bi şelîne, bi şelînin. |

| | |
|---|---|
| **Şelte** | (n.x.raê) Parçe perokeke jibo nalîk û lihêfkan bi kar di hêt.. |
| **Selûsepik** | (n.l.pirîn) Destê serûbin yên cilên kurdîne ko ji merezê bizineçîran hatine diristkirin. Bergîz. |
| | Selwal (n.dar.nêr) Parçeya binî ya cilê kurdî. |
| **Şelwar** | (n.dar.nêr) Şelwal. |
| **Şema** | (n.x.raê) Keresteyekê civir û nerme ji şaneya hingivê mêşan yan bezî hatîye çêkirin, jibo girêdan û tundkirina amêran mifa jê di hêt wergirtin. |
| **Şemalk** | (n.dar.raê) Gelek cor û şêweyên bezê hişikkirîne, pelîtiket pêveye, agirî ber di denê jibo r û nahî û bîranînan bi kar di hêt. Momik. |
| | 643 |
| **Şemam** | (n.x.nêr) 1 . fêqî Core gundorekê xîçxîçê ciwan.2. Xîç. |
| **Şemate** | (n.x.mê) Dengûdor. |
| **Şembî** | (n.x.mê) Roja dawîyê ji heftiyê ko di navbera înê û êkşembê daye. :Şembîyê li hin welatan, roja bêhinvedanê ye. Pend :Got cuhî were da bi bim beheştê; go ne !, evro şembî ye.ang şembî rojeka pîroze li cem cuhîyan. |
| **Şemboz** | (hk.çewa) Candarê har û zû ve di ciniqit, nemaze dewar. : Hesp, ker, hêstir yê şemboz. |
| **Şembzbûn** | (k.jn.I.raê) Har bûn. Veciniqîn. |
| **Şembûzkirin** | (k.jn.I.raê) Harkirin. Tirsandin. |
| **Şemdînan** | (hk.cih,cugra.raê) Dever,Bajareke li Kurdistana Turkî.Şerazînan. |
| **Şemendefir** | (n.dar.raê) Makîneka mezine,, ji çendîn fargonan pêk di hêt ,ya veguhaztina mirov û karên bazirganî ye.Tirên. |
| **Şemê** | (hd.n.gaz.raê) Nav û naznavê gazîkirinê ye jibo jinan. |
| **Şemitandin** | (k.jn.raê) Hilisandin. Tehisandin. |
| **Şemitîn** | (k.jn.x.raê) Tehisîn. Hilisîn. |
| **Şemitok** | (hk.dar.çewa) Cihê hilû yê mirov yan tişt liser di hilisit. Tehisok. Baran barî, bersiva xanî ya bûye şemitok. |
| **Şemî** | (hk.dera) Şerabî. |
| **Şemkor** | (n.I.dn) candar Çekçekîle. Şevkork. |
| **Şemo** | (hd,n,gaz,.nêr) Nav û naznavê gazîkirinê jibo mêran. |
| **Şemûz** | (hk.çewa) bn: Şemboz. |
| **Şene** | (n.x.nêr) Xermaşe. |
| **Şenekirin** | (k.jn.I.raê) Hilû  kirina paqijkirina erdê çandinê ji dexel, ber, û giyanên ziyandar. Xerraaşekirin. |
| **Şeng** | (hn.x.çewa) l.Ciwan. Rind. Xweşik. Şox.2. Keyficweş. |
| **Şengal 1** | (n.dar.raê) Darkezwan. Darkeskan. |
| **Şengai 2** | (hk.cih,cugira.dar) Bajêreke li Kurdistana baş û r. |
| | 644 |
| **Şengebî** | (n.I.raê) dar Corek bîhokane, xemil ciwane, ta û belgên wê wek pora sreran şor di bit xwar. Bîşeng. |
| **Şengebîk** | (hk.l.çewa) Bûka ciwan û şox û şeng. |

| | |
|---|---|
| **Şengiste** | (n.dar.nêr) Cokên kolayî jibo dîwarên avahîyan. Binetar.. Bingeh. :Me şengiste danane dê dîwarekî ava keyn. |
| **Şengeşox** | (hk.I.pesin,n.çewa) Ciwan. Şox û şeng. |
| **Şens** | (n.x.nêr) Carenivîsê baş yan. Lêhatin. : Mirovê bi şens. Ang; mirovê bo lê di hêt. Bişens Brx Bêşens. |
| **Şensê** | (n.gaz.mê) Naznavê jina bi şens ,hin caran bêşens. |
| **Şenso** | (n.gaz.nêr) Naznavê mêrê bişens, caran bêşens. |
| **Şep** | (n.x.raê) 1. Mist. Tep. 2. Dengê lêdana mistekê. |
| **Şepal** | (hn,hk.dar.çewa) 1 . Ciwan. Rind.2. Şêra mê. 3. Navê keçane. |
| **Şepane** | (n.x.mê) Pîne. Bizmarkên darî. |
| **Şepanekirin** | (k.jn.l.raê) Bizmar lê dan. Bizmardan. |
| **Şepeşor** | (hk.I.çewa) Mirovê bêserûber. Ne lêkdayî. Ne peyt. Ji berêkçûyî. |
| **Şepên** | (n.dar.raê) deng Dengê lêdana şep û mistan. |
| **Şepik** | (n.x.nêr) Parçeya serî ji şelûşepikên kurdî. |
| **Şepilandin** | (k.jn.dar.raê) Xwe alozkirin. Alozkirin. Xwe tengavkirin ko karê xwe bi dawî bînit. Tengavkirin. (K) bdn :ez şepilînim, em di şepilînîn, tu di şepilînî, hûn di şepilînin, ew di şepile[…it], ewan di şepilin. Pr : dê + bdn. Bdb :di şepiland, di şepilandin. Db,dûr :şepilandibûm, …bûyn, .. bûn, … bûn. (F) : bi şepilîne, bi şepilînin. |
| **Şepilî** | (rd.dar.çewa) l.Mirovê bêserûber. 2. Karên di kevin serêk mirov jê demakeve. Şepirze. |
| **Şepilîn** | .epizebûn. Tengavbûn. (K) Bdn : Ez di şepilim, em di şepilîn, tu di şepilî hûn di şepilin, ew di şepile[…it] ewan di şepilin. Pr : dê bi + bdn. Bdb: di şepilîm, di şepilîn , şepilî, di şepilin, di şepilî, di şepilîn. D,dûr: şepilîbûm, …bû, … bûy, …bûyn, …bûn. (F) : bi şepile, bi şepilin. |
| **Şepirze** | (hk.pesinn.çewa) 1 .Mirovê gelek mijîl û bi kar .Şepilî. 2. Core giyayeke dême û bi serike. |
| **Şepirzebûn** | (k.jn.I.mê) Mirov xwe tengav di ket dako karê xwe serkeftî bi dawî bîne.şepilîn. (K) bn : Bûn. |
| | 645 |
| **Şepirzekirin** | (k.jn.I.mê) Xwe tengavkirin. Xwe şepilandin. (K) bn: Kirin. |
| **Şepirzeyî** | (n.dar.mê) Tengavî. Dudilî. |
| **Şepîlk** | (n.x.mê) can Çengên mirşk û balindeyan. : Min du kîloyên şepîlk û rankên mirîşkan jibo firavînê kirîn. |
| **Şepol** | (n.x.mê) Pêl. |
| **Şeq** | (n.x.mê) I. Kelişte. Peq.2.Dengê lêdana desti. Dengê lêdanê dengê qutanê bi panka destî. |
| **Şeqam** | (n.x.mê) I.Şeq. Zileh. 2. Cade. Şarê. |
| **Şeqandin** | (k.jn.x.mê) Peqandin. Teqandin.: Tiveng şeqandin. Telhe şeqandin. (K) bdn: Ez di şeqînim em di şeqînin, tu di şeqînî hûn di şeqinin.ew di şeqîne[. . .it] ewan di şeqînin. Pr : Dê[bi] şeqînim, şeqînîn,şeqînî, şeqînin, şeqînit[...ne], şeqînin. |

| | |
|---|---|
| | Bdb Di şeqand, di şeqandin. Db,dûr : şeqandibû, ...bûn. (F): bi şeqîne bi şeqînin. |
| **Şeqbûn** | (k.jn.I.raê) Wekî tiştek şeq di be. Keliştin. :Dîwarê xanî yê şeqbûye. Erd ji têna da şeqbûye. .(K) bn: Bûn. |
| **Şeqî** | (n.x.raê) Xizmetkar. Zehmetkês. Pend :Şeqîyo, mandîyo ne terazî diyare, ne weqîyo. |
| **Şeqîbûn** | (k.jn.I.mê) Kesê xizmeta mirovan di ke. Zehetkêşan (K) bn: B û n. |
| **Şeqkirin** | (k.jn.I.mê) Co tê vekirin. Çêkirina şeqan. Kelaştin (K) bn: Kirin. |
| **Şeqie** | (n.x.nêr) Darên kelaştî û birî jibo sotin û karên din. Kête Nîre. Ezînk. |
| **Şeqlemaşt** | (n.I.mê) Avemast. Dew. |
| **Şeqşeqbûn** | (k jn.I.raê) Şeq di kevin cihekî. :Destên wî û ber karî yen Şeqşeqbuyn. |
| **Şeqşeqkirin** | (k.jn.I.mê) Mirov tiştekî bi kêrkê yan het devekê tîj şeq bi ke.Pirtpirtkirin. |
| **Şeqyan** | (k.jn.x.mê) Vêkketina du tiştan û deng jê hatin Teqîna peqina tiveng, top û htd. : Telhek şeqya. Tiveng şeqya. |
| **Şer** | (n.x.nêr) Pevçûn. Pevdaçûn. Pend :Şer û nîvşer her yekin. Pend:Şer ji bêkarîyê çêtire. Pend :Şer bi şîrî bazar bi diravî. Pend •Şer govenda mêrane. Pend :Şerî di gel rojê di ke.[jibo ciwanîyê di hêt gotin]. pend :Şerê ser şovê baştire ji gengeşa ser cuxînê[bêder]. |
| | 646 |
| **Şeranis** | (hk.cih,cugm.x.mê) Gundeke li Kurdistana Iraqê. |
| **Şeranişî** | (malbn.dar.dz) Xelkê şeranişê. |
| **Şerbet** | (n.x.mê) Vexwarin. Xoşav. |
| **Şerçûn** | (k.jn.I.raê) bi Şerçûn. Pevçûn. Lêkkevtin. (K) bn: Ç û n. |
| **Şeredev** | (n.l.raê) Bi dev girtine hev. Cire. Dujwarbûna gengeşê. Şerenîx. |
| **Şeref** | (n.x.raê) Namûs. Sinc. |
| **Şerenîx** | (n.dar.mê) Şeredev. Cire. Gengeşe. |
| **Şerfiros** | (hk.L.çewa) Mirovê belakir. Mirovê herdem li şer û têkdanê di gere. |
| **Şergeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê şerî. Qada şerî. |
| **Şerim** | (n x.mê) Fedî. Pend :şerma dinyayê ji (ezaba) gorî mezintire.Pend :şermê û tirsê ne kin hevalên xwe, da pêşeman nebin ji biryar û axivtinên xwe. |
| **Şerimkirin** | (k.in.l.raê) Hest bi şermê kirin.Fedîkirin. |
| **Şerimkirî** | (hk.I.çewa) Mirovê karekê ne rewa kirî ko şermê ji xwe dike. |
| **Şerimrevandin** | (k.jn.I.raê) Dema yek karekî bi ke yan gotinekê bêje ko şerim a mirovî bi çe û êdî mirov fedi ne ke. |
| **Şerkar** | (kara.dar.dz) Mirovê pişikdarî şeran di be. Mirovê hez ji şeran di ke. |
| **Şerker** | (kara.dar.dz) bn :Şerkar. |
| **Şerkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov şerî di ken. Pevçûn. (K) bn : Kirin. |
| **Şermin** | (hk.cih,cugrn) Gundeke li Kurdistana başûr. |
| **Şerminî** | (raalb,na.x.dz) Xelkê Şerminê. |
| **Şermizar** | (hk.I.pesin,çewa) Mirovê şermizar; mirovê ketiya kirasê şermê.Mirovê karekê xirab kirî û li ber çavên xelkê kêm bûyî.Riswa. |
| **Şermizarbûn** | (k.jn.l.mê) Riswabûn: (K) bn : Bûn. |

| | |
|---|---|
| **Şermizarî** | (n.l.raê) Fehêti. Riswayî. |
| **Şermizarkirin** | (k.jn.l.raê) Riswakirin. Direw derêxistin. (K) bn : Kirin. |
| | 647 |
| **Şermîn** | (hn,dar, pesin,çewa) 1. Mirovê şermê dike.2. Navê keçane. Pend :Jina şermîn bi şarekî, mêrê şermîn bi karekî. BRx Bêşerim |
| **Şermînî** | (n.dar.raê) Rewişta, nexweşîya şermê li cem mirovî. |
| **Şermînok** | (rd.dar.çewa) Şermîn. |
| **Şernex** | (hk.cih,cugn) Bajareke li Kurdistana bakûr. |
| **Şerpeze** | (hk.çewa) bn: Şepirze. |
| **Şeryan** | (pîşn.dar.dz)I. Kesê pişkdarîyê di şerîda di ket. Çekdarê karê wî şerê berevanîyê ji ax û rastiyê. . 2. Navê mêrane. |
| **Şeş** | (hij,n.x.çend) Hijmara 6. |
| | |
| **Şeşalî** | (n.l.mê) endaze Şêweyî endazeyî ji şeş rexan pêkhatîye. |
| **Şeşbalik** | (n.l.mê) endaze Şeşalî. |
| **Şeşbêj** | (hk.l.çewa) Mirovê gelek di axive û mijaran têkel di ke.Pirbêj. |
| **Şeşem** | (hijn.rêz.çend) Şeşê. |
| **Şeşemîn** | (hijn.rêz.çend) Şeşê. |
| **Şeşê** | (hn.çnd) Ya şeşê. Rêza şeşê. |
| **Şeşêk** | (hk.çend.raê) Yek ji şeşê. 1/6. |
| **Şeşgoşe** | (n.endaz.I) Şeşkujî. |
| **Seşkujî** | (n,endaz.I) Şêweyek endazeyî ye, ji şeş kujî yan seran pêkhatî ye. |
| **Şeşhizar** | (hij,n.çend.I.raê) Hijmara 6000. |
| **Şeşlûleb** | (hk.l.çewa) Mirovê pirbêj. |
| **Şeşmilyon** | (hij,n.l.çend) Hijmara 6000000. |
| **Şeşsed** | (hij,n.I.çend) Hijraara 600. |
| **Şeşik** | (n.dar.raê) Şeş rojên xudê peristinê ne. |
| **Şeşxane** | (pesin,n.çewa. n.l) çek Tivenga şeş xane he bin. |
| **Şet** | (hk,pesin,n.x.çewa) Xar. Kheç. |
| **Şetrenc** | (n.cih) Yarîyeke pê di lîzin, ji şeş reng yan coran pêkhatîye, şah, şalyar[wezîr], leşker, kelhe, hesp û fîl. |
| **Şev** | (hk.dem.n.x.mê) Duwazde demhijmêr ji rojavabûnê tanî elindê ko dinya tarî di be. Pend :Şevê nale nale, rojê hespê fale. Pend:Şeva tarî ji êvarî diyare. Pend :Şev êke, diz hizarin. |
| | 648 |
| **Şevaborî** | (hk.dem) Berîna şevekê. Şivêdî. |
| **Şevaçûyî** | (hk.dem.l) Şevaborî. |
| **Şevadin** | (hk.dera.I) Şevaborî. |
| **Şeyadî** | (hk.dera.n.I.mê) Berî du Şevan . Pêr bi şev. |
| **Şevba** | (n.I.mê) Bayê xweş û hînk yê şevan. |
| **Şevbaran** | (n.I.raê) Barana bi şevê di barit. Tevên baranê li şevê. |
| **Şevbaş** | (silav.n.l) Silava şevê ye, mirov daxaza şeveka baş û xweş dike. |

| | |
|---|---|
| **Şevbêrî** | (n.dar.I.mê) Borandina şevê, bi suhbet, çîrok, stiran û htd. |
| **Şevbêrîkirin** | (k.jn.I.mê) Şev derbazkirin. Borandina şevê. :Şevadî me şevbêrîya xwe li mala Genco kir. |
| **Şevbêrk** | (n.dar.mê) Şevbêrî. |
| **Şevborî** | (n.l.mê) Şevbêrî. |
| **Şevçira** | (n.I.raê) 1 .Şevên taveheyva wan di ronin wek çirayî. 2. candar mêşik Stêrok. |
| **Şeveng** | (n.dar.raê) Şebeng. |
| **Şeverok** | (n.ldar.mê) Şevbêrî. |
| **Şevêdî** | (hk.dem.n.I.raê) Şivêdî. |
| **Şevger** | (hn,hk.l.çewa) l.Mirovê bi şev di gerit.2. Navê mêrane.3. candar Kimkime. |
| **Şevgur** | (hk.I.çewa) Tarîgewirk. |
| **Şevî** | (hk.çewa) Şevek bi serda çûyî. :Ava şevî bi tam û tezî ye. Girara şevî. |
| **Şevîbûn** | (k.jn.I.raê) Tiştê, xwarin û vexwarina şev bi serda di çe. (K)Bn: Bûn. |
| **Şevîkirin** | (k.jn.I.raê) Xwarin û vexwarinên di hêne vegirtin heyama şeveke. Şevek bi serda di çit. (K) bn : Kirin. |
| **Şevîn** | (n.dar.mê) Mirov yan candar li aqarekî, cihekî bi şev di nivin. |
| **Şevkor** | (hk.l.çewa) Mirovê bi şev na bîne, yan baş na bîne. |
| **Şevkorî** | (n.I.mê) derd Nexweşîyeke çavên mirovî bi şevê baş na bînin. |
| **Şevreşî** | (n.l.mê) bn: Şevkorî. |
| | 649 |
| **Şevreşk** | (n.I.nêr) Giyanên kirêt û pîrhevî yên bi sehim ko liber çavên mirovî çê di bin, nemaze bi şevê. Reşê şevê. |
| **Şevrevînk** | (n.l.dz) Çekçekîle. |
| **Şevşevik** | (n.l.dz) Çekçekîle. |
| **Şevroj** | (hk.dem.n.I.raê) Dema şev û rojekê, 24 demhijmêr. |
| **Şevtiradî** | (hk.dera.nl.mê) Berî sê Şevan. Pêş sê şevan. |
| **Şevtirk** | (n.I.mê) Diyarîyeka bi tiraneye, jibo civatê xwarinek wek mêwîj, g ûz û htd. Yan vexwrin, di hêt peydakirin, ji ber ko yekî li dîwanê tireka kendî. |
| **Şevtirsk** | (hk.pesin.n.I.çewa) Tirsa şevê. |
| **Şevxweş** | (silav) Silaveke bi şevê di hêt kirin. : Noke dema xewê ye ez dê çim, ; şeva hewe xweş. |
| **Şevxweşman** | (k.jn.gl.raê) Silava malavayîkirinê bi şev. : Şeva we bi raîne xweş. |
| **Şevyar** | (n.I.raê) Nêçîra bi şev. ;Babo herşev di çit şevyarê. |
| **Şevzengil** | (n.I.raê) Di çîrokên kurdewarîda şevek heye li werzê zivistanê ko aqildarekî zengilek li ber derê mala xwe bi darek dirêj çikilandbû dako zêrevanîya befrê bi kit, heta demekê demgê zengilê qutb û ye di befrêra hinda bû . Şevên befreka mezin di kevit. |
| **Şewat** | (n.x.mê) 1. Agir. 2.Sotin. 3 .Kovan. |
| **Şewatek** | (n.dar.mê) Tiştên bi kêr sotinê di hên nemaze yên kar pêkirina makînan. Panzîn, gaz, mazot û htd şewatekin. : Jiber pevçûnan li welatî qetlazîya şewatekê ye. |

| | |
|---|---|
| **Şewişandin** | (k.jn.l.mê) Madeyekê şil,rûn mirov di amanekî bi livînit tanî deng jê di hêt. Şilqandin. |
| **Şewitandin** | (k.jn.x.raê) Sotin. (K) Bdn :ez di şewitînim. Era di şewitînîn, tu di şewitînî hûn di şewitînin, ew di şewitîne[. . .it] ewan di şewitinin. PR: dê[bi] şewitinira, şewitînîn, şewitînî, şewitînin, şewitîne, şewitînin. Bdb: (rain, te, wî wê di şewitand) , (rae, hew[we]wan[ewan]di şewitandin). db,dûr: şewitaindibû , . . .bûn. (F): Bi şewitîne, bi şewitînin. |
| **Şewitîn** | (k.jn.x.raê) Sotin : Dar di şewite. Dilê me di şewitî. |
| **Şeyda** | (hn,hk.x.çewa) Sergerdan. Evîndar. Dîn. |
| **Şeyîn** | (k.jn.x.mê) bn: Şihîn. |
| | |
| **şeytan** | (n.x.nêr) 1.Xudayê şer û xirabkarîyê.2. şûm. Ne rawestayî.Zorzan. |
| **şeytanî** | (n.x.mê) şûmatî. Ne hecimtin. Ne tena. |
| **şeytanîkirin** | (k.jn.l.mê) şûmatîkirin. Ne hecimtin. (K) bn : Kirin. |
| **şeytanok** | (n.dar.mê) Candare, nerim û hilûye li şopa wî teratîyek wek gilîzî reng sipî di mînit û xwe di nav qalikeka req da di veşêre. Guhmasî. |
| **şêlandin** | (k.jn.x.mê) şêlûkirin. şêlîkirin. (K) bdn : ez di şêlînim em di şêlînîn, tu di şêlînî hûndi şêlînin, ew di şêlîne[...it] ewan dişêlînin. Pr :dê [bi]+bdn. Bdb : min, te, wê,w : di şêland, me, we[hewe], wan[ewan] di şêlandin. Db,dûr : şêlandibû, şêlandibûn. (F) : bi şêlîne, bi şêlînin. |
| **şêlav** | (n.l.mê) Dema av ra di bin bi ser erd û rezan da di hêt xwar û di axê têkel di bit û şêlî di bit. |
| **şêlim** | (n.x.mê) giya Core giyayeke belgêd wî di pan û kesk in, serikek mezin û reng şîrî di bin axê ra di girit, serik û belgên wî di hên xwarinê. |
| **şêlimtirşk** | (n.l.mê) Tirşîyê ji şêliman di hêt çêkirin. |
| **şêlî** | (hk.çewa) Tiştê ne rûn. Ne xuya. Ne zelal. Ava şêlî.ang ; Ava ne zelal. Br×Zelal. |
| **şêlîbûn** | (k.jn.l.mê) Dema tiştek şêlî di be. Av şêlîbûn Ang ; Ava bi kurê ra têkel di be.Ava êdî bi kêrî vexwarinê na hêt. (K) bn:Bûn. |
| **şêlîkirin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov tiştekî şêlî bi kit. Têkdan. (K) bn: Kirin. |
| **şêlîn** | (k.jn.x.mê) Tazîkirin, xwe tazîkirin. Xwe şelandin. |
| **şêlo** | (hn.x.çewa) şêlî. |
| **şên** | (hk,pesin,n çewa) Dilveker. Xweşik. Rind. Ciwan. |
| **şênî** | (hk,pesin,n.çewa) Avakirî. Peyt. Lêkdayî. |
| **şêr** | (n.x.nêr) candar Canewerekê dirinde, şîrder û kûvîye, paşayê daristan û candarane.2. Mêrxas. Mêrçak. Çavnetirs. Pend :şîrêşêran, di meşka şêran , şêr bi xwe bi doşit.[mêrxasî]. Pend :şêr di mire çerim di mîne, mêr di mire nav di mîne. |
| **şêrane** | (rd.dar.çewa) Mirovê çavnetirs kar kiryarêd wî mîna şêran. |
| **şêrdil** | (n.l.dz.pesinn.çewa) 1. Mêrxas. Dilşêr. 2. Navek kurdî duzayene. |
| **şêrejin** | (hk,pesinn.çewa) Jina çavnetirs weke şêran. |
| **şêrgeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê şêran. Warê mêrxasan. |
| **şêrîn** | (rd.x.çewa) 1. şêrane. 2. Tama şekirê. |

| | |
|---|---|
| **şêrko** | (n.gaz.dar) 1.Naznav, yan navê biçûkirî yê şêrî.2. Navê mêrane. |
| **şêrpence** | (n.l.mê) bn: Penceşêr. |
| **şêrvan** | (karnn.dar.dz) 1. şivanê, xwedîyê şêran. 2. Navek kurdî ye. |
| **şêrwan** | (hk.cih,cugrn,n.dar.nêr) 1. Bajêrkek û gundekin li Kurdistana Iraqê. 2. Navê mêrane. 3. şêrê Wanê. |
| **şêrwanî** | (malb.n.dar.dz) Xelkê şêwanê. |
| **şêrzad** | (n.l.dz) 1. Têjikê şêran.2. Navê mêrane. |
| **şêst** | (hijn.çend) Hijmara 60. |
| **şêstem** | (hijn.rêz.çend) Ya,yê,yêd şêstê. |
| **şêstemîn** | (hijn.rêz.çend) şêstem. |
| **şêsthizar** | (hijn.l.çend) Hijmara 60,000. |
| **şêstmilyon** | (hijn.l.çend) Hijmara 60,000,000. |
| **şêt** | (hk.x.çewa) Dîn. Dîvane. |
| **şêtbûn** | (k.jn.l.mê) Dînbûn. (K) bn: Bûn. |
| **şêtî** | (n.dar.mê) Dînî. Dînatî. |
| **şêtkirin** | (k.jn.l.mê) Dînkirin. (K) bn: Kirin. |
| **şêtxane** | (hk.cih.n.l.mê) Cihê şêtan. Xanîyê dînan. |
| **şêwaz** | (n.x.mê) Reng. Cor. |
| **şêwe** | (n.x.mê) Çewanîya pêkhatina tenan. Awa. Reng. Cor. :şêweyê xanî çarkujî ye. |
| **şêx** | (n.x.dz) Mirovê dîndar û malmezin. |
| **şêxan** | (hk.cih,cugrn) Bajêreke li Kurdistana Iraqê devera Mosil. Êsifnê. |
| **şêxanî** | (n.dar.mê, malbn) 1. Xelkê şêxan.2. Corek govenda kurdîye. |
| **şidandin** | (k.jn.x.mê) Givaştin. Tundkirin. : Bar şidand. Destê wî girt û şidand[givaşt] (K) Bdn: ez,em, tu, hûn, ew, ewan [di] şidînim, idînîn, şidînî, şidînin,şidînit[…ne], şidînin. PR: dê[bi] şidînim,..û htd . Bdb : [di] şidand, şidandin. D,dûr: şidandibû,..bûn.(F) :bi şidîne, bi şidînin. |
| **şiftî** | (n.x.mê) fêkî Zebeş.şitî. |
| **şikandin** | (k.jn.dar.mê) Mirov tiştek req ker bi ke. Bi ke perçe.şêweyê tiştî têk bi çe.Pirtkirin.(K) Bdn : ez, em,, tu, hûn, ew, ewan; [di]şikênim, şikênîn, şikênî, şikênin, şikêne[…it], şikênin. Bdb: di şikand, di şikandin. D,dûr: şikandibû,…bûn. . (F): bi şikêne. bi şikênin. |
| **şikeft** | (n.x.mê) Kunên mezin li çîya û keviran. Berevezên mezin. Ziving.: Li çiyayên Kurdistanê pir şikeft hene. |
| **şikestin** | (k.jn.x.mê) Perçebûn. Kherbûn. Kevtin.Ppaşverevîn:Destê min yê şikestî. Dujmin di berokên şerda şikest. |
| **şikestî** | (rd.x.çewa) Hatîye şikandin. |
| **şikev** | (n.dar.mê) Sindoqk yan zilînka nan têda paraztinê. |
| **şikevik** | (n.dar.mê) 1.Axa cerikan. Axa gozikan. 2.Cerik. Lînik. |
| **şikênandin** | (k.jn.dar.mê) şikandin. |
| **şikêr** | (hk.cih,n.x.mê) 1.Cihê bi kevir, darûbar û asê. Kelişte ûşikeftên asê û kûr li çiyan. |
| **şil** | (hk.x.çewa) 1. Madeyên rûn wek, avê. Ter. 2. Mirovê seqet. Kêmendam. |

| | |
|---|---|
| **şilapindk** | (n.dar.mê) Giyayk dav zirav û rng ksk, mîna belgên gijnîje, serik (pîvazok)ek sipî hye tamxweşe. |
| **şilbûn** | (k.jn.l.mê) Tişt bi avê yan madeyek rûn ter di bit. Terbûn.(K) bn: Bûn. |
| **şilêr** | (n.x.mê) gul 1. Corek gulane. Sosin. 2. Navê keçane. |
| **şilik** | (n.dar.mê) Kilovanka serî. |
| **şilî** | (n.dar.mê) Barê madeyên şil. |
| **şilindir** | (n.x.mê) giya Core giyayekê, belg keske, serikek di axê ra mezin di bit reng sore, mîna şêlimane. Silik a sor. |
| **şilkirin** | (k.jn.l.mê) 1.Gihorîna madeyî ji barek req, gaz bo yê şil. 2.Rûnkirin.Terkirin. (K) bn: kirin. |
| **şiloke** | (n.dar.mê) Teva barana hûrik. |
| **şilop** | (n.x.nêr) Kinîşt. |
| **şiloxe** | (n.x.mê) Bendikên peytkirina kalik û reşikan(pêlav). |
| **şilxe** | (n.x.mê) Komeka mêşhingivan bi hev re. |
| **şim** | (n.x.mê) Nala jin û mêran. Qebqebk. |
| **şimik** | (n.dar.mê) şim. Pend : Ji şimik ê ta kumik ê. Ang; weke mirov cilên nû ji serî ta pêlavê li xwe di ke. |
| **şindoxa** | (hk.cih,cugirn) Gundeke li Kurdistana başûr - devera Duhok. |
| **şingal** | (hk.cih,cugr,n.mê) Bajêrekê kevnare li Kurdistana başûr - devera Mosil. şengal |
| **şino** | (hk.cih,cugrn.x) Bajareke li Kurdistana Iranê. |
| **şipne** | (n.x.nêr) Xermaşe. |
| **şipnekirin** | (k.jn.l.mê) 1. Zevî, rez bax, xermaşekirin. 2. Darên bêwic ji zevî, rezan rakirin[birîn]. |
| **şir** | (hk.x.çewa) 1.Tembel. Westayî. Bêgêwil.Xav.2. Dengê kevtina avê. |
| **şiratî** | (n.dar.mê) Tembelî. |
| **şirbûn** | (k.jn.l.mê) Xavbûn. Kesîrebûn. Têrbûn. Bêzarbûn. (K) bn: Bûn. |
| **şirenqe** | (n.x.mê) Derzî ya dermanê av tê di kin li leşê mirov û candaran di din jibo çare û bergirîyê. |
| **şirepên** | (n.dar.mê) şepên. |
| **şireşir** | (n.l.mê) deng şirên.:şireşira çokên kolanaye. |
| **şirên** | (n.dar.mê) deng Dengê ketina avê ji cihekê bilind bo binî. :Dengê şirêna avê ya di hêt diyare barana di barit?. |
| **şirik** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê av jê di kevit xarê û şirên jê di hêt. şirika avê. |
| **şiringên** | (n.dar.mê) deng Dengê lêkdana destan. |
| **şirîn** | (hn.çewa) 1. Tameka taybete, wek ya şekirê. 2. Mirov yan tiştê xweşik, balkêş. : Ew zarokek şirîne.3.Navê keçane. |
| **şirînbûn** | (k.jn.l.mê) Xwarina bi têkirina şekirê tama wê şirîn di be. (K) bn: Bûn. |
| **şirînî** | (n.dar.mê) Tiştê şirîn; şekrok. mirovê şirîn. Pend :şirînîya darê ji belgane. Pend :şirînî ji şaran di hêt, hingiv ji waran di hêt. Pend :Ji şirînîya mêwê kurmêwkê di mêjit. |
| **şirînkirin** | (k.jn.l.mê) Zadê bi şekirê di hêt şirînkirin. Mirovê bi axivtinên xweş û nazik xwe şirîn dike. (K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **şirkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov na xwaze bizavekê bi ke.Tembelkirin. Xwe şirkirin; Xwe tênegehandin. Na xwazit bi karekî rabit. (K) bn: Kirin. |
| **şirove** | (n.x.mê) Zelalkirin.Ronkiririn. Zelal. |
| **şirovekirin** | (k.jn.l.mê) Ronkirin. Zelalkirin. :Seyda rewşa welatî ji mera şirove kir.(K) bn: Kirin. |
| **şirovekirî** | (hk.l.çewa) Mijara hatîye şirovekirin. |
| **şit** | (n.x.nêr) Tişt. |
| **şitanê** | (n.dar.mê) yarî Gilçanê. |
| **şiv** | (n.x.mê) Dareke zirave nîvreqe, di hêt çemandin, fişyan, şivan, karikvan, gavan û htd di destê xwe di girin jibo hajotina terş û dewaran. |
| **şivan** | (karn.dar.dz) 1. Mirovê di çe ber pezî. Sexbêrvanê terş û kewalan. :şivan binivit, pez dê bir bit.2. Navê mêrane. |
| **şivanberx** | (karn.l.dz) şivan ê,..a, berxan. Berxvan. |
| **şivandilke** | (n.l.mê) balinde Sivandok. |
| **şivankar** | (karnn.l.dz) şivan ê, ..a, karikan. Kharikvan. |
| **şivêdî** | (hk.dem.l) şeva borî. şeva çûyî. Duh bi şev. |
| **şivik** | (n.dar.mê) şiv. |
| **şixate** | (n.x.mê) Elbikeka biçûke zilik têdane jibo agirkirinê bi kar di hêt. Elbikazilkan. |
| **şiwat** | (hk.dem.x.mê) Meha duwê. Sibat. |
| **şiyan** | (k.jn.x.mê) Karîn. (K) Bdn: ez di şêm, em di şên[şêyn]tu dişêy hûn di şên, ew di şê[..êt] ewan di şên. PR: Dê[bi] şêm,şêyn, şêy, şên, şêt, şên. Bdb: [di] şiyam, şiyayn, şiyay, şiyan, şiya, şiyan. Db, dûr: şiyabûm, ..bûy,…, bû,… bûn. (F): Bi şê, bi şên. |
| **şiyandin 1** | (k.jn.x.mê) bn : şandin. |
| **şiyandin 2** | (k.jn.l.mê) Bilindkirina astî. Bi hêzkirin. Pêşêxistin. :Zandorek jibo şiyandina mamostayan hat ve kirin. |
| **şiyar** | (hn.dar.çewa) bn :Hişyar. |
| **şiyarbûn** | (k.jn.l.mê) bn :Hişyarbûn. |
| **şiyarî** | (n.dar.mê) bn : Hişyarî. |
| **şiyarkirin** | (k.jn.l.mê) Bn :Hişyarkirin. |
| **şî** | (n.x.nêr) Hevjîn. Mêr. |
| **şîjin** | (n.x.mê) Derzîyeka mezine cewal, xirar têrikan pê di dirûn. Pend :Derzîyê di çavên xelkî da di bînit, lê şîjinê di çavên xwe da na bînit. Ang; şaşiyên xwe di veşêrit, yên xelkî rexne di ke. şûjin. |
| **şîkirin** | (k.jn.l.mê) Dema keçek bi fermî li dadgehê, yan bi rêya zanayên dînî bi be jina mêrekî. şûkirin. Mêrkirin. |
| **şîlan** | (n.x.mê) gul 1. Corekê gulane. 2. Navê keçane. |
| **şîlav** | (n.dar.mê) Ava fêqî. Xoşav. |
| **şîle** | (n.x.mê) Aveka şirîne ji gul û fêqî di peyda di be. |
| **şîn** | (hk.x.çewa) 1.Rengeke. Rengê esmanî, derya. 2. şûn.Cih. |
| **şînayî** | ( n.dar.mê) Dar, giya û tiraşên hişîn, bi xemil. |

| | |
|---|---|
| **şînbûn** | (k.jn.l.mê) 1. Gihorîna rengê tiştî ber bi şînî ve cihek şîn bi be.2. Tiştê ko hatî çandin bi ser erdî di keve û wederê di ke.Bi xemilkeftina riwekî. Hişînbûn. (K) bn: Bûn. |
| **şîndar** | (rd.dar.çewa) Mirovê bi şînî. Xemdar. Behîdar. |
| **şîngirêdan** | (k.jn.l.mê) Jiber mirina kesekî, mirov behiyê di dane. Behîdan. |
| **şînik** | (n.x.mê) Depekê pan û reqe, destikek heye, jinan jibo şûştina cilikan bi kar di hînan, dema cilikên bi av û kef liser kevirekî di danîn bi şînkî lê di xistin da qirêj jê bi derkeve. |
| **şînî** | (n.dar.mê) 1.Ji egera çamekê yan mirina xweşdivîyekî mirov nemaze, pîrek cilên şîn li xwe di kin. Behî. 2. şînkatî. |
| **şînkirin** | , hişînkirin (k.jn.l.mê) 1. Çandina mitayî darûbar çandin ko xemila erdî şîn bi be.2. Erdek, dîwarek yan cihek bi rengê şîn bi hêt rengkirin . :Me dîwarê xanîyê xwe şîn kir. (K) bn: Kirin. |
| **şînwar** | (n.l.nêr,hk.l.cih) 1. Cîhê mirov lê peydabûyî yan mezinbûyî. Warê mirovî. Welatê mirovî. Cihê bîranînên mirovî. şûnwar. 2. Navê mêrane. |
| **şîqşîq** | (n.l.mê) Qêjî. Qîjandin. |
| **şîqşîqî** | (hk.dar.çewa) Mirovê şîqşîqê di ke.:Ew jineka gelek şîqşîqî ye. |
| **şîqşîqkirin** | (k.jn.l.mê) Qîjandin. Hewarkirin. (K) bn: Kirin. |
| **şîr** | (n.x.nêr) 1. şilelekê sipî ye ji guhanên candaran di hêt. 2. şûr; çekekê kevinê pevçûnanê ye ji hesine,di destê xwe di girin li dujminê xwe di xin. |
| **şîranî** | (n.dar.mê) şirînî. |
| **şîrbira** | (n.l.nêr) Birayê yê şîrê dayka mirovî xwarî. : Ez û ew birayên hevin , çunkî min şîrê diya wî xwarî ye. |
| **şîrbirinc** | (n.l.mê) xwarin Core zadekê şile ji birinc û şîrî çê di kin. |
| **şîrdan** | (k.jn.l.mê) Dana şîrî. Giyandarên bi şîr şîrî di din têjikên xwe. (K) bn: Dan. |
| **şîrder** | (hk.dar.çewa) Giyandarên bi şîr, mîna bizin, çêl, seg, gur, şêr û htd. |
| **şîre** | (n.x.mê) Keresteyekê çire jibo derînana mûyan bi kar di hêt. |
| **şîret** | (n.x.mê) Gotinên bi mifa. Rêya rast nîşadan. Fêrkirina karê dirist. |
| **şîretdan** | (k.jn.l.mê) şîret lê kirin. |
| **şîretgirtin** | (k.jn.l.mê) Wergirtina şîretan. : Berî ez bi çim zandora hînbûna zimanî, ez di xwazin çend şîretan ji te bi girim[wergirim]. şiretkirin (k.jn.l.mê) Dema şîret li yekî di hên kirin jibo karê çak û neçak ji hev cuda bi ke. (K) bn:Kirin. |
| **şîretlêkirin** | (k.jn.l.mê) Ji şaşîyê bi dûr êxistin. Rênîşadana dirist. Dema yek pilanên baş nîşanî mirovî bi de. (K) : Kirin. |
| **şîretvan** | (karn.dar.dz) Mirovê zana û şareza ko şîretan di de mirov, dezgeh karbidestan. |
| **şîretwergirtin** | (k.jn.l.mê) bn :şîretgirtin. |
| **şîrêz** | (n.dar.mê) 1.Ava fêqî. Xoşav.2. Strk. Cewî. |
| **şîrêzkirin** | (k.jn.l.mê) Pêkve nûsandin. : Kaxezê bi dîwarî ve şîrêz bi ke. |
| **şîrhe** | (n.x.mê) Çeper. Dîwar. Kelek. |
| **şîrhekirin** | (k.jn.l.mê) Dîwarkirin. : Mamê min şîrheka li dor rezê xwe ava kirî. |
| **şîrikî** | (rd.dar.çewa) Rengê mina şîrî. |

| | |
|---|---|
| **şîrî** | (rd.dar.çewa) şîrikî. |
| **şîrîn** | (hn.x.çewa) bn :şirîn. |
| **şîrînbûn** | (k.jn.l.mê) bn :şirînbûn. |
| **şîrînî** | (n.dar.mê) bn :şirînî. |
| **şîrînkirin** | (k.jn.l.mê) Zadê bi şekirê di hêt şirînkirin. Mirovê bi axivtinên xweş û nazik xweşirîn dike. (K) bn: Kirin. |
| **şirkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov na xwaze bizavekê bi ke.Tembelkirin. Xwe şirkirin; Xwe tênegehandin. Na xwazit bi karekî rabit. (K) bn: Kirin. |
| **şirove** | (n.x.mê) Zelalkirin.Ronkiririn. Zelal. |
| **şîrvekirin** | (k.jn.l.mê) Ronkirin. Zelalkirin. :Seyda rewşa welatî ji mera şirove kir.(K) bn: Kirin. |
| **şirovekirî** | (hk.l.çewa) Mijara hatîye şirovekirin. |
| **şit** | (n.x.nêr) Tişt. |
| **şitanê** | (n.dar.mê) yarî Gilçanê. |
| **şiv** | (n.x.mê) Dareke zirave nîvreqe, di hêt çemandin, fişyan, şivan, karikvan, gavan û htd di destê xwe di girin jibo hajotina terş û dewaran. |
| **şivan** | (karn.dar.dz) 1. Mirovê di çe ber pezî. Sexbêrvanê terş û kewalan. : şivan binivit, pez dê bir bit.2. Navê mêrane. |
| **şivanberx** | (karn.l.dz) şivan ê,..a, berxan. Berxvan. |
| **şivandilke** | (n.l.mê) balinde Sivandok. |
| **şivankar** | (karnn.l.dz) şivan ê, ..a, karikan. Kharikvan. |
| **şivêdî** | (hk.dem.l) şeva borî. şeva çûyî. Duh bi şev. |
| **şivik** | (n.dar.mê) şiv. |
| **şixate** | (n.x.mê) Elbikeka biçûke zilik têdane jibo agirkirinê bi kar di hêt. Elbikazilkan. |
| **şiwat** | (hk.dem.x.mê) Meha duwê. Sibat. |
| **şiyan** | (k.jn.x.mê) Karîn. (K) Bdn: ez di şêm, em di şên[şêyn]tu di şêy hûn di şên, ew di şê[..êt] ewan di şên. PR: Dê[bi] şêm,ş êyn, êy, şên, şêt, şên. Bdb: [di] şiyam, şiyayn, şiyay, şiyan, şiya, şiyan. Db, dûr: şiyabûm, ..bûy,…, bû,… bûn. (F): Bi şê, bi şên. |
| **şiyandin 1** | (k.jn.x.mê) bn : şandin. |
| **şiyandin 2** | (k.jn.l.mê) Bilindkirina astî. Bi hêzkirin. Pêşêxistin. :Zandorek jibo şiyandina mamostayan hat ve kirin. |
| **şiyar** | (hn.dar.çewa) bn :Hişyar. |
| **şiyarbûn** | (k.jn.l.mê) bn :Hişyarbûn. |
| **şiyarî** | (n.dar.mê) bn : Hişyarî. |
| **şiyarkirin** | (k.jn.l.mê) Bn :Hişyarkirin. |
| **şî** | (n.x.nêr) Hevjîn. Mêr. |
| **şîjin** | (n.x.mê) Derzîyeka mezine cewal, xirar têrikan pê di dirûn. Pend :Derzîyê di çavên xelkî da di bînit, lê şîjinê di çavên xwe da na bînit. Ang; şaşiyên xwe di veşêrit, yên xelkî rexne di ke. |
| **şîkirin** | (k.jn.l.mê) Dema keçek bi fermî li dadgehê, yan bi rêya zanayên dînî bi be jina mêrekî. şûkirin. Mêrkirin. |

| | |
|---|---|
| **şîlan** | (n.x.mê) gul 1. Corekê gulane. 2. Navê keçane. |
| **şîlav** | (n.dar.mê) Ava fêqî. Xoşav. |
| **şîle** | (n.x.mê) Aveka şirîne ji gul û fêqî di peyda di be. |
| **şîn** | (hk.x.çewa) 1.Rengeke. Rengê esmanî, derya. 2. şûn.Cih. |
| **şînayî** | ( n.dar.mê) Dar, giya û tiraşên hişîn, bi xemil. |
| **şînbûn** | (k.jn.l.mê) 1. Gihorîna rengê tiştî ber bi şînî ve cihek şîn bi be.2. Tiştê ko hatî çandin bi ser erdî di keve û werarê di ke.Bi xemilkeftina riwekî. Hişînbûn. (K) bn: Bûn. |
| **şîndar** | (rd.dar.çewa) Mirovê bi şînî. Xemdar. Behîdar. |
| **şîngirêdan** | (k.jn.l.mê) Jiber mirina kesekî, mirov behiyê di dane. Behîdan. |
| **şînik** | (n.x.mê) Depekê pan û reqe, destikek heye, jinan jibo şûştina cilikan bi kar di hînan, dema cilikên bi<br>av û kef liser kevirekî di danîn bi şînkî lê di xistin da qirêj jê bi derkeve. |
| **şînî** | (n.dar.mê) 1.Ji egera çamekê yan mirina xweşdivîyekî mirov nemaze, pîrek cilên şîn li xwe di kin. Behî. 2. şînkatî. |
| **şînkirin** | , hişînkirin (k.jn.l.mê) 1. Çandina mitayî darûbar çandin ko xemila erdî şîn bi be.2. Erdek, dîwarek yan cihek bi rengê şîn bi hêt rengkirin . :Me dîwarê xanîyê xwe şîn kir. (K) bn: Kirin. |
| **şînwar** | (n.l.nêr,hk.l.cih) 1. Cîhê mirov lê peydabûyî yan mezinbûyî. Warê mirovî. Welatê mirovî. Cihê bîranînên mirovî. şûnwar. 2. Navê mêrane. |
| **şîqşîq** | (n.l.mê) Qêjî. Qîjandin. |
| **şîqşîqî** | (hk.dar.çewa) Mirovê şîqşîqê di ke.:Ew jineka gelek şîqşîqî ye. |
| **şîqşîqkirin** | (k.jn.l.mê) Qîjandin. Hewarkirin. (K) bn: Kirin. |
| **şîr** | (n.x.nêr) 1. şilelekê sipî ye ji guhanên candaran di hêt. 2. şûr; çekekê kevinê pevçûnanê ye ji hesine,di destê xwe di girin li dujminê xwe di xin. |
| **şîranî** | (n.dar.mê) şirînî. |
| **şîrbira** | (n.l.nêr) Birayê yê şîrê dayka mirovî xwarî. : Ez û ew birayên hevin , çunkî min şîrê diya wî xwarî ye. |
| **şîrbirinc** | (n.l.mê) xwarin Core zadekê şile ji birinc û şîrî çê di kin. |
| **şîrdan** | (k.jn.l.mê) Dana şîrî. Giyandarên bi şîr şîrî di din têjikên xwe. (K) bn: Dan. |
| **şîrder** | (hk.dar.çewa) Giyandarên bi şîr, mîna bizin, çêl, seg, gur, şêr û htd. |
| **şîre** | (n.x.mê) Keresteyekê çire jibo derînana mûyan bi kar di hêt. |
| **şîret** | (n.x.mê) Gotinên bi mifa. Rêya rast nîşadan. Fêrkirina karê dirist. |
| **şîretdan** | (k.jn.l.mê) şîret lê kirin. |
| **şîretgirtin** | (k.jn.l.mê) Wergirtina şîretan. : Berî ez bi çim zandora hînbûna zimanî, ez di xwazin çend şîretan ji te bi girim[wergirim]. şiretkirin (k.jn.l.mê) Dema şîret li yekî di hên kirin jibo karê çak û neçak ji hev cuda bi ke. (K) bn:Kirin. |
| **şîretlêkirin** | (k.jn.l.mê) Ji şaşîyê bi dûr êxistin. Rênîşadana dirist. Dema yek pilanên baş nîşanî mirovî bi de. (K) : Kirin. |
| **şîretvan** | (karn.dar.dz) Mirovê zana û şareza ko şîretan di de mirov, dezgeh karbidestan. |

| | |
|---|---|
| **şîrêz** | (n.dar.mê) 1.Ava fêqî. Xoşav.2. Strk. Cewî. |
| **şîretwergirtin** | (k.jn.l.mê) bn :şîretgirtin. |
| **şîrêzkirin** | (k.jn.l.mê) Pêkve nûsandin. : Kaxezê bi dîwarî ve şîrêz bi ke. |
| **şîrhe** | (n.x.mê) Çeper. Dîwar. Kelek. |
| **şîrhekirin** | (k.jn.l.mê) Dîwarkirin. : Mamê min şîrheka li dor rezê xwe ava kirî. |
| **şîrikî** | (rd.dar.çewa) Rengê minaşîrî. |
| **şîrî** | (rd.dar.çewa) şîrikî. |
| **şîrîn** | (hn.x.çewa) bn :şirîn. |
| **şîrînbûn** | (k.jn.l.mê) bn :şirînbûn. |
| **şîrînî** | (n.dar.mê) bn :şirînî. |
| **şîrînkirin** | (k.jn.l.mê) bn :şirînkirin. |
| **şîrvekirin** | (k.jn.l.mê) Paş zarok mezin di be êdî dayk şîrê xwe jê di bire. Ji şîrî hat vekirin. : Ewê zarokê xwe şîrvekirîye. (K) : Kirin. |
| **şîtik** | (n.x.mê) Peroyeke li ser cilên kudî mêr û jin di pişta xwe di alînin.Piştên. |
| **şîv1** | (n.x.mê) Danê sîyê ji xwarinê. Xwarina şevê. :şîva şevê di mala wî da nebû. Pend :şîva du caran kelandî,nanê du caran reşandî, bûka du caran xemlandî, çi dilan ne evandî. Pend :şîvaşevê di mala wî da ne bû.ang ;hine yê hejar bû. |
| **şîv 2** | (n.x.mê) Nihal. Gelîyê biçûk. |
| **şobe** | (n.x.mê) derd Core nexweşîyeke belgên hişînkatî di girit. |
| **şofêr** | (pîşn.x.dz) Kesê tirombêlê di hajot. |
| **şofêrî** | (karn.dar. mê) Karê hajotina tirombêlan. |
| **şok** | (n.x.mê) şîşikeka sertîj û çemandîye bendikek dirêj pêveye û serê tîj kirimekî yan xwarinekê pêve di kin di havên avê jibo girtina masîyan. |
| **şokvan** | (pîşn.dar.dz) Kesê karê wî girtina masîyane bi şokê. Masîgir. Nêçîrvanê masîyan. |
| **şokvanî** | (karn.dar.dn) Karê girtina masîyan. Nêçîra masîyan. |
| **şol** | (n.x.nêr) Kar. Pend :şol şêre, heger mirovî dest havêtê dê bi be rîvî.Pend :şolê evro ne hêle bo sube. Pend :şola ne ji dil, na hête mil. |
| **şolker** | (karn.dar.dz) Mirovê hez ji şolî di ke. Karker. Rêncber. Pned:şolkerê xwe be xweşdivîyê xelkî be. |
| **şolkirin** | (k.jn.l.mê) Karkirin. (K) bn: Kirin. |
| **şop** | (n.x.mê) Eger. şûnpê.Rêbaz. Rêçik. |
| **şor** | (hk.x.çewa) Nizimkirî. Çemyayî. Hatîye xar.; Lêva şor, serêşor, çavên şor. |
| **şorbe** | (n.x.mê) Girara şil. Zadê ron. :şorbeya birincê. şorbeya nesaxan. |
| **şoreş** | (n.x.mê) Xebata çekdarî jibo sitandina mafên xwe. şoreşa agirî, şêx se ,idê Pîran, Barzan, Îlonê, Gulanê û htd. |
| **şoreşgêr** | (karn.dar.dn) bn : şoreşvan. |
| **şoreşkirin** | (k.jn.l.mê) Gel jibona azadîyê bi çekî şer di ke. (K) bn: Kirin. |
| **şoreşvan** | (karn.dar.dz) Kesê pişikdarîyê di şoreşê de di ke.Pêşmergeh. |
| **şorkirin** | (k.jn.l.mê) Çemandin. Nevîkirin. Nizimkirin. :Firokeyên dujminî li hindav gundî xwe şorkirin.(K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **şoşandin** | (k.jn.x.mê) Peyveke jibo rawestana dewaran di hêt gotin. Oşandin. şoş kero; em gehiştîn malê. Ang; raweste. :Hespê xwe bi şoşînin. (K) bdn:ez di şoşînim em di şoşînîn, tu di şoşînî hû dişoşînin, ew di şoşîne[...it] ewan di şoşînin. Pr:dê [bi]+ bdn. Bdb: di şoşand, di şoşandin. D,bdûr: şoşandibû, şoşandibûn. (F) bişoşîne, bi şoşînin. Br× Wuşandin. |
| **şoşê** | (hk.cih. cugrn) Guneke li devera Akrê Kurdistana Iraqê. |
| **şoşî** | (malbn.dz) Xelkê şoşê. |
| **şov** | (n.x.mê) Zevîya kêlayî ne çandîye, da qelew bi be. |
| **şovkirin** | (k.jn.l.mê) Kêlana zevîyê da jibo sala din qelew bi be. (K) bn: Kirin. |
| **şox** | (rd.x.çewa) Rind. Ciwan. Xweşk. şeng. |
| **şoxûşeng** | (hk.pesn.l.çewan) bn :şengeşox. |
| **şubatê** | (hk.dem) Meha duwê ye ji zivistanê. Pend :şubatê befir û ba tê. |
| **şun** | (hk.cih) şûn. Cih. |
| **şunda** | (hk.dem) li Paş. Paşda. |
| **şudagirtin** | (k.jn.l.mê) Dubare wergirtin. Carek din wergirtin. |
| **şudahavêtin** | (k.jn.l.mê) Paşvehavêtin. Paşdahêlan. |
| **şundahiştin** | (k.jn.l.mê) Li paş hêlan . Paşda hêlan. Li paş xwe hiştin. |
| **şundaman** | (k.jn.l.mê) Paşveman. Paşda man. |
| **şunwar** | (n.l.mê) şînwar. |
| **şuştin** | (k.n.x.mê) şûştin. (K) bdn: ez di şûm, em di şûn[ûyn], tu dişûy hû di şûn, ew di şû [şût[ ewan di şûn. Pr: dê bi + bdn. Bdb: di şûşt, di şûştin. Db,dûr: şûştibû, ...bûn. (F): bi şû, bi şûn. |
| **şû** | (n.x.mê) Mêr. Hevjîn. |
| **şûdan** | (k.jn.l.mê) Mirovê semyan, keçekê bi mêr bi de. Dane şwî. : Wî keça xwe da şû.(K) bn: Dan. |
| **şûkirin** | (k.jn.l.mê) Mêrkirina.: Keça apê min şû kir.(K) bn: Kirin. |
| **şûl** | (n.x.nêr) bn : şol. |
| **şûm** | (hk.x.çewa) Nehecimtî. Netena. Ew zaroyekê şûme. şwîm. |
| **şûmatî** | (n.dar.mê) Nehecimtin. Nerawestan. |
| **şûmatîkirin** | (k.jn.l.mê) Zarok tena nabit. şûmatîyan di ket. .: Vî zarokî gelek şûmatî yên kirîn. (K) bn: Kirin. |
| **şûn** | (n.x.mê) Cih. |
| **şûnik** | (n.x.nêr) şînik. |
| **şûnkar** | (karn.l.dz) Kesê li şûna yekî[ berpirsekî] kar di ke.Cihgir. şûnkarê şalyarî. şûnkara rêvebirî. |
| **şûnpê** | (n.l.nêr) şûna pêyê mirov û candaran li ser erdî çê di bin. şwîna pêyan. |
| **şûnwar** | (n.l.nêr) Cihê mirov lê peyda di bit û mezin di bit.Cihwar. Welat. |
| **şûp** | (n.x.mê) şûn. Eger. Rêk. |
| **şûpkirin** | (k.jn.l.mê) şûplêkirin. Nîşan yan eger li cihekî hêlan.Egerlêkirin. |
| **şûr** | (n.x.mê) 1.şer. Pevçûn. 2. çek şîr. |
| **şûre** | (n.x.mê) bn :şîrhe. |
| **şûreşûr** | (n.l.mê) deng bn :şirên. |

| | |
|---|---|
| **şûreşûrkirin** | (k.jn.gl.mê) şireşirkirin. Hatina dengê şirêna avê. |
| **şûşe** | (n.x.mê) 1. Keresteyekê reqe, di hêt şikandin, rone yan rengîne.2. Amannê ji şûşeyan diristkirîn. |
| **şûx** | (hn.x.çewa) Rind. Ciwan. Xweşik. şeng. |

# T

| | |
|---|---|
| **T** (te) | Pîta bîst û çarê ji abeya kurdî. |
| **Ta** 1 | (n.x.nêr) 1. Çeqê darê. :Tayê darê. 2. Dezî. |
| **Ta** 2 | (pêrb) ***rêzman*** Alavê merc.Heta.Tanî. : Ji vêrê ta mal ez bi pêyan çûm. Ta tu ne hêy, ez na çin !. |
| **Ta** 3 | (n.x.mê) ***derd nexwe_î*** Bilind û nizimbûna pileyên la_ê.mirovî. Ta gerim, ta sar. |
| **Ta** 4 | (n.x.mê) Kit. Ket. Lib. :Tayekê terazîyê. Tayekê cewalî. ***Pend***:Tayek û barek yekin. Rex. Alî. |
| **Tab** | (n.x.mê) Ronîya rojê. Tava rojê. Tav. |
| **Tabir** | (hk.l.çewa) Dermanên dijî tayê. Dezîyên mela di xin destê nexweşan da tayê ji canê wî bi bire. |
| **Tablo** | (n.x.nêr) Keval. |
| **Taf** | (n.x.mê) Bela. Nexweşî. Derd. Ataf. Arê_e. :Tu na rûnî dê tafek bi serê te hêt. |
| **Tafîl** | (hk.x.çewa) Bijîn. Paqij. |
| **Tafîlkirin** | (k.jn.l.mê) Pakijkirin ji gemarê. Bijînkirina tiştê herimî. şûştin. : Mencelê tafîr ke şûna devê segî ye. (K) bn: Kirin. |
| **Tafîlkirî** | (hk.l.çewa) Pakij. Bijîn. |
| **Tafîr** | (hk.x.çewa) bn:Tafîl. |
| **Tafîrkirin** | (k.jn.l.mê) Tafîlkirin. |
| **Tafîrkirî** | (hk.l.çewa) Tafîlkirî. **Tagir** (hk.l.çewa) Alîgir. |
| **Tagirî** | (n.l.mê) Alîgirî. |
| **Tagirîkirin** | (k.jn.gl.mê) Xwe dane bi alîyekî ra. Cudayîkirin navbera nas, heval mirovan da. :Tagirîyê neke navbera bira û pismamê xwe da!. |
| **Tagirtin** | (k.jn.l.mê) Alîgirtin. Xwe dan dkigel alîyekî ,dezgehekê. Alîyek girtin. (K) bn: Girtin. |
| **Tah** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo mixabinîyê bi kar di hêr. Tehe. Tehem.Mixabin. |
| **Tajî** | (n.x.dn) ***cadar*** Corekê seyane, di zirav û sivikin jibo nêçîrê bi kar di hînin. ***Pend*** :Tajî bi xurtî ravê naket.:Mirovekê hinde pê sivike wekî tajî di bezit. |
| **Tak** 1 | (n.dar.nê) 1. Tayê biçûk. 2. Dava biçûk. |
| **Tak** 2 | (hk.x.çewa) Tek. |
| **Tako** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pêvegire(merc).Heta. Tanî. |
| **Tal** | (hk.x.çewa) 1. Tameka nexweş ya taybete wek tama giyayê talîşk. Tama fêqîyê negehiştî. Tama çaya bê şekir. 2. Kirêt. Br× şirîn. |
| **Talan** | (n.x.nêr) 1. Dizî.2. Ferman.3. Mal û dirav. |
| **Talankirin** | (k.jn.l.mê) Giyandar, kewal, terş, çevrî milik û htd yên ko hatîne dizîn yan standin. Dizîn yan standina samanê mirovî. :Cerdevan terşê gundî talan kirin. . :Mala hevsîyê me ya hatî talankirin. (K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Talanlêdan** | (k.jn.gl.mê) Talankirin. |
| **Talav** | (n.l.mê) Ava tam wê tal. |
| **Talbûn** | (k.jn.l.mê) Tama xwarin û vexwarinê tal di be. (K) bn: Bûn. |
| **Talik** | (n.dar.mê) 1. Tal. 2. Corekê tirîyê tam tale. |
| **Talî** | (n.dar.mê) 1.Tama tal. Ne şirîn.2. Nexweşî. Tengavî. Taloke. 3. Çirçove. |
| **Talîşk** | (n.dar.mê) ***giya*** Giyaykê kesik, dema bizdandina bistîk û belgên wî şîr jê di hêt û tam tale. |
| **Talkirin** | (k.jn.l.mê) Bi tê xistina tiştê tal xwarin û vexwarinê tal di be.(K) bn: Kirin. |
| **Taloke** | (rd.dar.çewa) Nexweşî. Tengavî. Qetlazî. : Kawdanên deverê di talokene. |
| **Talsêv** | (n.l.mê) Sêva hişkkirî. Pirtên sêva hişkkirî. |
| **Tam** | (n.x.mê) Heskirina mirov û candaran jibo ji hev cudakirina xwarin û vexwarinan bi ezmanî û çewayîya cor û xweşîya wan. Çêj.Mije. |
| **Taman** | (n.dar.mê) Petirme. Petrome. Pîk. |
| **Tamandin** | (k.jn.dar.mê) 1.Petirmekirin. Petromekirin. Pîkkirin.2. Tamkirin. (K) bdn : ez di tamînim em di tamînîn, tu di tamînî hûn di tamînin, ew di tamîne[….it]. Pr :dê[bi]+bdn. Bdb : di tamand, di tamandin. Db,dûr : tamandibû, tamandibûn. (F) : bi tamîne, bi tamînin. |
| **Tamankirin** | (k.jn.gl.mê) Tamandin. |
| **Tamdan** | (k.jn.l.mê) Lêdana rengan . Bi tîvkilên fêqî gemirandin. :Tamdana pîstan; bi kelpên hinaran gemirandina pîstan. (K) bn: Dan. |
| **Tamdar** | (rd.dar.çewa) Bi tam. Çêjdar. : Zadê mal herdem yê tamdare. |
| **Tamêsk** | (n.dar.mê) bn :Tamîsk. |
| **Tamîsk** | (n.dar.mê) Corekê pirsikên hûrin li lêvan di hên piştî tayê. Tamîzk. |
| **Tamkirin** | (k.jn.l.mê) Xwarina tiştî û zanîna tama wî bi ezmanî. Tamandin.: Min tam kir hingvî.:Kabanîyê tam kir zadî, berî dane ber mêvanan. (K) bn: Kirin. |
| **Tamsar** | (hk.l.çewa) Mirovê lewçe. Mirovê xwînsar. Dargiran. Hestîgiran. :Kurekê tamsar. :Gotineka tamsar. |
| **Tamsarbûn** | (k.jn.gl.mê) Lewçe, hestîgiran bûn. :Wekî berê nemaye, gelek yê tamsar bûy !. |
| **Tamsarî** | (n.l.mê) Lewçeyî. Çivêlî. : Tu ji tamsarîyêd xo ve nabî. |
| **Tamsarîkirin** | (k.jn.gl.mê) Paravîkirin. Çivêlîkirin. : Ez hîvî di kim li cem xelikî tamsarîyan neke !.(K) bn :Kirin. |
| **Tamsarkirin** | (k.jn.gl.mê) Xwe tamsarkirin ; xwe bêtam, lewçe, çivêlkirin. :Xorto bes xwe tamsar bi ke !. |
| **Tamxweş** | (rd.l.çewa) Xwarin û vexwarinêd tamdar, bi tam. :Zadê tamxweş. :Ava tamxweş. |
| **Tamxweşbûn** | (k.jn.gl.mê) Tama zadî û vexwarinan xweş di bit. : Piştî karî kirî nav zadî tama wî gelek xweş bû. |
| **Tamxweşkirin** | (k.jn.gl.mê) Xweşkirina tama xwarinê. : Bê zehmet piçek darçînê bi ke nav çayê, tama wê xweş ke. |

| | |
|---|---|
| **Tamzêr** | (hk.l.çewa) Kanzayên wek ristik, gustîlk bi ava zêrî hatîn tamdan. |
| **Tamzêrkirin** | (k.jn.gl.mê) Bi ava zêrê tamdan. Di ava zêrî hilandin. |
| **Tan** | (n.x.nêr) Perjan. Kotan. :Tanê bizinî. :Tanê serbanî. |
| **Tana** | (n.x.mê) Hewar. |
| **Tanahatin** | (k.jn.l.mê) di Hewarê hatin. :Li tana min were, di [li] hewara min were. |
| **Tanc** | (n.x.nêr) Kulavê zêrî yê şahan ûşajinan. |
| **Tandan** | (k.jn.l.mê) Tankirin. |
| **Tanî** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê girêdanê, merc. Heta. Ta. |
| **Tank** 1 | (n.x.mê) Makîneka serbazîye, jibo pevçûnan dijî dujminan bi kar di hînin.Zirîpoş. |
| **Tank** | (zirîpoş) |
| **Tank** 2 | (n.x.mê) Amaneke avê tê di kin. |
| **Tanker** | (n.dar.mê) Tirombêleka mezine tanka avê li sere jibo av |
| | kê_anê bi kar di hêt. |
| **Tankirin** | (k.jn.l.mê) Perjankirin. :Rezê xwe tan kir. (K) bn : Kirin. |
| **Tanotî** | (hk.x.çewa) Mirov ji xerîbî yan dûrkevtin ji xweştivîyan korewar di bit. Evîndar. Têhnî. |
| **Tanotîbûn** | (k.jn.l.mê) Perîşanbûn. Korewarbûn. Xerîbbûn. Bîrkirin. |
| **Tanotîkirin** | (k.jn.l.mê) Bîrkirin. Xerîbkirin. |
| **Tapik** | (n.x.mê) bn :Tepik. Xefk. |
| **Tapî** | (n.x.mê) Çaleka kûre, gelek şêwe hene, dirêj, çarkujî, sêkujî û htd, mirov li berokên pevçûnan di kolin jibo di nav da bi mînin bersingê dujminî bi girin û şerî bi kin. |
| **Tapo** | (nbiyanx.mê) hebûna mil, mal, erd û htd. |
| **Tapokirin** | (k.jn.l.mê) Erd yan xanî tapokirin;ango bi awayê fermî liser navî hatin tomarkirin. :Xanîyê min yê tapokirîye, ang; li cem dezgehên fermî yê mine. |
| **Tapoxane** | (hk.cih,n.dar.mê) Cih yan rêvebirîya tomarkirina erd û malê liser navê kesekî ko maf têda heye.Dezgeha havildar bi karên tapokirinê ve. Rêvebirîya tapoyê. |
| **Taq** | (n.x.nêr) Dîwar. |
| **Taqiçk** | (n.dar.nê) Nîv dîwareke jibo rûniştinê yan aman û pertalan li ser dananê, bikar di hêt. |
| **Taqî** | (n.x.mê) Ezmûn. : Qutabîyan taqîyên nîva salê bi pileyên bijare encam dan. |
| **Taqîgeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê taqîkirinên zanistî. Ezmûngeh. |
| **Taqîkirin** | (k.jn.l.mê) Çewayîya zanîn û aşkerakirina zanistên nû.. (K) bn: Kirin. |
| **Tarî** | (hk.x.çewa) 1. Ne ronahî. :şeva tarî. :Çavên tarî. 2. Ne zelal. şêlî. |
| **Tarîbûn** | (k.jn.l.mê) Bûne tarî. Nemana ronahîyê.2. şêlîbûn. Çavên wî yên tarîbûyn ;ang dinyayê baş nabînit. (K) bn : Bûn. |
| **Tarîgewrk** | (n.l.mê) Dema dinya nîv tarî di be û bi diristî tarî ne kevtîye.:Tarîgewirka êvarî. :Tarîgewirka spêdê. |

| | |
|---|---|
| **Tarîkirin** | (k.jn.l.mê) bi Nehêlana ronahîyê biyav tarî di bit.Vemirandina ronahîyan. : (K) bn: Kirin. |
| **Tarîperist** | (hk.l.çewa) Kesê kotekîyê li mirov û jîngehê di ke û jibo tarî û paşdamanê herdem di xebite. :Tîrorist tarîperistin. :Dijminê tarîperist, ang; dijminê dijî pêşveçûnê. |
| **Tarîstan** | (n.dar.mê) Tarîbûneka berfireh a deverekê hemûyê di girit. şevên pir tarî. |
| **Tarîtî** | (n.dar.mê) Tarîstan. |
| **Tarîvan** | (hk.dar.çewa) Tarîperist. |
| **Tas** | (n.x.nêr) 1. Amanê avvexwarinê. Tirar. Badî. 2. Kulavê zêrî yê serê jinan. |
| **Taş** | (n.x.nêr) Pirteka ber yan asinê pan û tîj. Tefş. |
| **Taşeber** | (n.l.nêr) Pirta berê pan û tîj. |
| **Taşt** | (n.x.mê) ***xwarin*** bn : Têşt. |
| **Tatî** | (n.x.nêr) Berikek taybetîye, ji hirîya pezî çêkirîye. |
| **Tatîkirin** | (k.jn.l.mê) Cihek, pinîyek bi tatî bi hêt girtin, poşîn. (K) bn: Kirin. |
| **Tav** | (n.x.mê) 1. Ronîya rojê. Hetav. 2. Baran . Reşîşeya baranê. Baraneka kurt. ***Pend*** :Tava tergêye;ang tiştê bi lez di hêt zû di çit. ***Pend*** :Taveka baranê, navbera mehên nîsan û gulanê, çêtire ji bagurdanê zêrî li nîva dîwanê. Jiber giringîya barana van du mehan.[ Isê Dela] ev pende li bîra mîrê amêdîyê înabû. |
| **Tavbirin** | (k.jn.l.mê) Leşê mirovî li ber tava rojê di şewite. : Tavê leşê [te,min, wî wê û htd] yê birî. |
| **Tavgeh** | (hk.cih,n.dar.mê) 1.Cihê bêhinvedan û demborandinê, tav lê di dit av lê heye, ne maze li bihar û havînan.2. Sîlav. |
| **Tavgez** | (n.l.mê) Tavbirin. Sotin. Sotin bi tavê. |
| **Tavgezîn** | (k.jn.l.mê) 1. Gerimeka mezin ko tav di gezit. 2. Tavbirina canê mirovî. |
| **Tavlêdan** | (k.jn.l.mê) Tava rojê li cihekî di keve.:Roj derkeft, tavê li gundî da. :Sipêyan zû em ji banî di hên xwar, çunkî tav li me di de. |
| **Tawan** | (n.x.mê) Sûç. Guneh. |
| **Tawanbar** | (hk.dar.çewa) Gunehbar. Sûçbar. |
| **Tawanbarbûn** | (k.jn.gl.mê) Gunehbarbûn. Sûçbarbûn. |
| **Tawanbarî** | (khk.çewa) Gunehbarî. |
| **Tawanbarkirin** | (k.jn.gl.mê) Gunehbarkirin. : Miovek bi guneha dizînê hat tawanbarkirin. |
| **Tawankirin** | (k.jn.l.mê) Gunehkirin. |
| **Tawî** | (rd.dar.çewa) 1.Mirovê bi derdê melarya kevtî.2. Mirovê tavbirî. |
| **Tawîbûn** | (k.jn.l.mê) 1.Nexweşîya melarya girtin. Toşî melarya bûn.2. Tavbirin. |
| **Tawis** | (n.x.nêr) 1. Navê xudayê tavê li cem kurdên kevin. 2. ***balende*** Balindekê ciwan û rengîne. |
| **Tax** | (hk.cih,n.x.mê) Pişkeka bajarî yan gundî. Taxa jûrî. Taxa binî. Rendek. Rex. Mil. Alî. |

| | |
|---|---|
| **Taxe** | (n.x.mê) Tiştên ciwan liser hev hatîn danan.Deste. Rêz. Texe. :Taxeya tûtinê. |
| **Taybet** | (hk.x.çewa) 1.Mirov,candar yan tiştê hindek salix hene li cem yên dî nînin. 2.Nemaze. Xasime. |
| **Taybetmend** | (hk.l.çewa) Mirov yan tiştê hindek taybetî hene, bi wîve di girêdane. |
| **Taybetmendî** | (n.l.mê) Herkes yan hertiştî taybetîyên xwe hene. :Gelê kurd taybetmendîyên xwe hene, wek ziman, erd, tîtal û htd. |
| **Taze** | (rd.x.çewa) 1. Ter.Nû. Nûgehayî 2. Ciwan.Rind. |
| **Tazebûn** | (k.jn.l.mê) 1. Ciwanbûn,. Rindbûn. Xweşikbûn. 2. Nûbûn. |
| **Tazekirin** | (k.jn.l.mê) 1. Nûkirin.Nûjenkirin 2. Ciwankirin. (K) bn: Kirin. |
| **Tazekirî** | (rd.l.çewa) 1. Nûkirî. 2. Ciwankirî. |
| **Tazî** 1 | (n.x.mê) Behî. şînî. |
| **Tazî** 2 | (hk.x.çewa) Mirovê bê cil.Rwîs. |
| **Tazîkirin** | (k.jn.l.m) Cil xistin. Rwîskirin. Cildanan : Xwe tazî kir; ang xwe rwîs kir. (K) bn: Kirin. |
| **Te** | (cihn.tek) ***rêzman*** 1. Cihnave jibo kesê duwê yê kit(tek). : Te jin înaye?. Te zad xwarîye?. Te çima wesa kir?. ***Pend*** :Te girt bernede, te berda, li dû neçe. *Pend* :Te çend heye, bi hindê dihînî. 2. Hebûna kesê duwê yê kit. Mala te, Bavê te, serê te û htd. |
| **Teba** | (hk.x.çewa) Kesekê nediyar. Tiştê nediyar. : Ew çi tebaye? Ang; çi kese, tişte. |
| **Tebane** | (n.x.nêr) Derpê kurt. Tebanî. |
| **Tebaşîr** | (n.dar.nêr) Corekê gêçê ye, wek qelemî dirist kirîye jibo nivîsînê liser texreşî bi kar di hînin. |
| **Tebax** | (hk.dem,n.dar) Meheke ji werzê havînê. Meha heşte. ***Pend***:Tebaxê tav li axê. ***Pend*** :Tebaxê ne çe kemaxê. Ang ; meha tebaxê pir germe, jibo guhnelîyê ya girane. ***Pend*** :Tebaxê tirî kefte ser axê. |
| **Tebayî** | (hk.çewa) Wekhevî. Bi hevre. Tevayî. Aştî. ***Pend*** :Tebayî åmê[hemû xelk] dê çîn şamê. |
| **Tebel** | (n.x.mê) Core şûşeyeka girovire, zarok pê di lîzin. Mat. |
| **Tebelanê** | (n.dar.mê) ***yarî*** Lîztina bi tebelan . Yarîya tebelan. |
| **Tebelanêkirin** | (k.jn.l.mê) Lîztina bi tebelan.Yarîya tebelanê di kin. (K) bn: Kirin. |
| **Tebek** | (n.x.mê) Core amaneke ji şivan yan zilan dirist kirîye, pan firehe, nanî tê di xin. Zilînk. |
| **Teber** | (n.x.mê) 1. Amêrekê kevine,wek bivrane jibo şeran bi kar di hat. Tevir. 2. Tebel. |
| **Tebeşîr** | (n.dar.nêr) bn :Tebaşîr. |
| **Tebitandin** | (k.jn.mê) Tenakirin. (K) bdn: ez di tebitînim em di tebitînîn, tu di tebitînî hûn di tebitînin, ew di tebitîne[…it] ewan di tebitînin.Pr:dê[bi]+bdn. Bdb: di tebitand, di tebitandin.Db,dûr: tebitandibû, tebitandibûn. (F) : bi tebitîne,bi tebitînin. |
| **Tebitî** | (rd.x.çewa) Tena. Hawîş. Mit. Bêdeng. :Zarokeka tebitî. |

| | |
|---|---|
| **Tebitîn** | (k.jn.x.mê) Rawestan. Hecimîn. Tenabûn. : Zarokno çima hûn na tebitin, çi bela weye?. (K) bdn: ez, em, tu, hun, ew, ewn[di] tebitim, tebitîn, tebitî, tebiteit[…te], tebitin PR: [dê] bi+bdn. Bdb: [di] tebitîm, tebitîn, tebitî. db,dûr : Tebitîbûm, ..bû, …bûn. . (F) bi tebite, bi tebitin. |
| **Teble** | (n.x.mê) 1. Dihol. Def. 2. Mêze. Mêzeya biçûk. |
| **Tebo** | (n.x.mê) ***can kirmijok*** Core kêzeka kirmijoke, liser xwîna Candaran di jît. |
| **Tedarek** | (n.x.mê) Berhevî. Pêrabûn. |
| **Tedarekkirin** | (k.jn.l.mê) Xwe berhevkirin. Cihek berhev kirin jibo civîn,aheng, seyran û govendan. :Wan tedareka xwe kirine jibo veguhaztina bûkê. (K) : Kirin. |
| **Tefşî** | (n.x.nêr) Core tevirkekê biçûk û dev tîje, jibo renîn û tiraşîna dar û depan bi kar di hînin. |
| **Tefşo** | (n.x.nêr) bn :Tefşî. |
| **Tegere** | (n.x.mê) Asteng. |
| **Teh** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo mixabinîyê bi kar di hêt. Tehem. |
| **Tehem** | (pêrb) ***rêzman*** bn :Teh. :Tehem xwezî ew çam bi serê wî ne bi hata! |
| **Tehisandin** | (k.jn.mê) Dema tişt liser hev di hilisin. Jiber hilûbûna wan tişt xwe liserêk nagirin. :Pêyên wî liser qerîsê tehisîn û kevt.(K) bdn : ez di tehisînim em di tehisînîn, tu di Pr : dê bi + bdn. Bdb : di tehisand, di tehisandin. Db,dûr : tehisandibûm, tehisandibû, tehisandibûn. (F) : bi tehisînee, bi tehisînin. |
| **Tehisîn** | (k.jn.x.mê) Mirov yan tişt liser cihek hilû di hilisit. Hilisîn. Vezelyan. (K) bdn : ez di tehisim em di tehisîn, tu di tehisî hûn di tehisin, ew di tehise[…it] ewan di tehisin. Pr : dê [bi] tehisînim,tehisînî,tehisînin, tehisîne[…it] tehisînin. Bdb : ez di tehisîm, tu, ew ;di tehisî, em, hûn, ewan di tehisîn. Db,dûr : tehisîbûm, ..bû, … bûn. (F) : bi tehise, bi tehisin. |
| **Tehîn** | (n.x.mê) Xwarineke, kuncîyan di qelîn û li aşî diken taşileyeka tîr jê peyda di bit.Doşava kuncîyan. |
| **Tehjî** | (n.x.dn) bn :Tajî. |
| **Tehnûsik** | (n.dar.mê) Tamîsk. |
| **Tehre** | (n.x.mê) Kele germa havînê, nexasin li nîvrojan[nîvro].: Erê ma mejîyê te na hehit li ber vê tehrê tu kar di kî?. |
| **Teht** | (hk.cih,n.x.nêr) Cihek rik û asê. Kevirên mezin û pan. |
| **Tejî** | (hn.x.çewa) bn :Tijî. |
| **Tek** | (hk.x.çewa) Yek bi tinê. Kit. Ket. |
| **Tekandin** | (k.jn.mê) şilqandin. Hejandin. (K) bdn :ez di tekînim, em di tekînîn, tu di tekînî hûn di tekînin, ew di tekîne[…it] ewan di tekînin. Pr:dê[bi] +bdn. Bdb: di tekand, di tekandin. Db,dûr: tekandibû, tekandibûn. (F) :bi tekîne, bi tekînin. |
| **Tekane** | (hk.dar.çewa) Êkane. |
| **Tekya** | (hk.cih,n.x.mê) Cihê civîn, xudaperistin, xwandinên olî, û alîkarîya hejaran. |

| | |
|---|---|
| **Telar** | (n.x.mê) Koçik. |
| **Telaş** | (n.x.nêr) Parçeka ji qurmê darî yê bi bivrî hatî kelaştin û jê ve kirin. |
| **Telhe** | (n.x.mê) 1. Amêreke ji hesin dirist kirîye li çolan û ber rez û baxan ve di din, jibo girtina giyandarên kûvî, weke rûvî, kêvrîşk, sîxur, gur û htd..Telî.2. Pîlan. |
| **Telhemişk** | (n.l.mê) Xefka mişkan. |
| **Telhevedan** | (k.jn.l.mê) Vedana telhê di rêya giyaneweran dako bi kevinê. :Karê nêçîrvanî telhevedane. (K) bn: Dan. |
| **Telî** | (n.x.mê) Telhe. |
| **Telîs** 1 | (n.x.nêr) Gûnî. Ferde. :Telîsê kayê. |
| **Telîs** 2 | (hk.x.çewa) Dema cilik diber mirovîda di bin av jiber baranê yan ketin avê. Ter. şil. |
| **Telp** | (n.x.mê) Deste. Revde. Bir. Texe. :Telpekê befirê yê keftî. |
| **Tem** | (n.x.mê) Mij. |
| **Temar** | (n.x.mê) Giranîya xewê ku di kevit çavan mirov di nivit. Gêjbûna xewê. |
| **Temaşe** | (hk.x.çewa) 1.Tiştê mirov di xwazit lê binêrit.Balkêş. 2. Nêrîn. |
| **Temaşekirin** | (k.jn.l.mê) Nêrîn. Berêxwedan. Mêzekirin. :Temaşe kir têlefizyonê. (K) bn: kirin. |
| **Temaşevan** | (n.dar.dz) Bîner. :Temaşevanên bernameya êvarbaş gelekin. |
| **Temate** | (n.x.mê) 1.Doşava bacansorkan ya di kin nav zadî ji ber |
| | tamdan û rengkirinê. şîlava bacansorkan.2. ***giya*** Bacansor. |
| **Tematekirin** | (k.jn.l.mê) Peqandin û givaştina bacansorkan jibo çêkirina temateyê. : Me evsale gelek temate ya kirî .(K) bn: kirin. |
| **Tembel** | (hn.x.çewa) Gemjo. Gemşo. Kêrnehatî. ***Pend*** :Tembelê bin dara qespê ye. |
| **Tembelî** | (n.dar.mê) Bêkarî. Gemjoyî. Bêxemî. |
| **Tembûr** | (n.x.mê) ***mûzîk*** Amêrekê mûzîkê ye. |
| **Tembûrvan** | (pîşn.dar.dt) Pisporê warê jenîna amêrê tembûrê. Lêderê, lêdera tembûrê. |
| **Temen** | (n.x.nê) Jî. : Temenê te çende ? ang ; jîyê te çende? Tu çend salîyî?. |
| **Temendirêj** | (hk.l.çewa) Jîdirêj. Kevin. Gelek bi temen. |
| **Temendirêjî** | (n.l.mê) Jîdirêjî. : Daxaza temendirêjîyê bo di kin. |
| **Temenkurt** | (hk.l.çewa) Mirovê kêm temen. Tiştê zû pûç di bit.Jîkurt. |
| **Temenkurtî** | (n.l.mê) Jîkurtî. Kêm. |
| **Temet** | (hk.çend) Peyveke jibo hevberkirina mezinî, dirêjî û pirînîyê bikar di hêt. Hindî. Wek. Mîna. : Ev kevre temet xanîyekîye. Ez ew temet êkînang ; hindî êkîn bi (temen, dirêrêjî qelewî û htd). |
| **Temirandin** | (k.jn.x.mê) Vemirandin. Agirtemirandin, rûnahîtemirandin. Pifkirin, av pêdakirin ta di vemirit. (K) Bdn : Ez di temirînim, em di temirînîn, tu di temirînî hun di temirînin, ew di temirîne […it]ewan di temirînin. PR : Dê [bi]+bdn. . Bdb : di temirand.di temirandin. Db,dûr : Temirandbû,.. bûn. (F) : bi temirîne, bi temirînin. |

| | |
|---|---|
| **Temirî** | (hk.çewa) 1. Agir, ronahî ya hatî temirandin. Ne hilkirî.2. Mirovê nexweş hay ji xwe nebe.Mirov di xeweka kûr da. |
| **Temirîn** | (k.jn.x.mê) 1. Agir vemirîn. 2. Bêdengbûn. Hay ji xwe neman. |
| **Temizandin** | (k.jn.mê) Pêkve nûsandin. Pêkvekirin. |
| **Ten** | (n.x.nêr) 1. Tiştê cihekî di girit û giranî hebit. Leş. 2. Yekeyeka pîvanê ye. 1000 kîlo. |
| **Tena** | (hk.x.çewa) Hawîş. Bêdeng. Aram.:Biçûkekê tenaye. |
| **Tenabûn** | (k.jn.l.mê) Hawîşbûn . bêdengbûn. :Ev kure çima tena nabe?.(K) bn: bûn. |
| **Tenaf** | (n.x.nêr) Kinif. Werîs. |
| **Tenafbaz** | (kar.dar.dn) Pelewanê ser ristê. |
| **Tenahî** | (n.dar.mê) Tenayî. |
| **Tenakirin** | (k.jn.l.mê) Hawîşkirin.(K) bn: kirin.: Ew zaro yê di girît, tena ke. |
| **Tenayî** | (n.dar.mê) Aramî. Xweşî. Bextewerî. |
| **Tendirist** | (hk.l.çewa) Saxlem. Nojdar. |
| **Tendiristî** | (n.l.mê) Nojdarî. |
| **Tendûr** | (n.x.mê) Tenûr. |
| **Teneke** | (n.x.mê) 1. Madeyekê reqe 2. Amaneke ji madeyê tenekê hatîye çêkirin rûn,av, doşav û htd tê di xin. |
| **Tenê** | (hk.x.çewa) Bi tenê. Ne bi kesê re. Ne di gel tu kesan, tiştan.Tinê. : ew maye bi tenê. |
| **Teng** 1 | (hk.çewa) Biçûk. Ne fireh. Bb×Fireh.: Pêlava teng.binkiraskê teng. |
| **Teng** 2 | (n.x.mê) Qayîşeka pan û dirêje, ji mûyên bizin yan hirîya pezî hatî çêkirin, ya girêdan û peytkirina kurtanê dewaran. |
| **Tengal** | (n.l.mê) Navteng. Kêlek. |
| **Tengasî** | (n.x.mê) bn :Tengavî. |
| **Tengav** | (hk.dar.çewa) Ne tena. şepirze. Dilteng. : Ez j iber te pir tengavim. |
| **Tengavbûn** | (k.jn.l.mê) şepirzebûn. (K) bn : bûn. |
| **Tengavî** | (n.dar.mê) Kawdanên berteng. Nexweşî. ***Pend*** :Tengavî di dûv kurtin. |
| **Tengavkirin** | (k.jn.l.mê) Bêgavkirin. Bela xwe lêdan. Bela xwe jê ve ne kirin.(K) bn : kirin. |
| **Tengbûn** | (k.jn.l.mê) Têkçûna tiştê, cilikên fireh. Têkçûn. Br× Firehbûn. (K) bn: bûn. |
| **Tengdest** | (hk.l.çewa) Hejar. Destkurt. Kêmdirav. :Mirovekê tengdeste. |
| **Tengdestî** | (n.l.mê) Hejarî. Kêmdiravî. :Tengdestî li welatê kêm bûye. |
| **Tengdil** | (hk.l.çewa) Dilteng. Bêhinteng. Tengav. |
| **Tengdilî** | (n.l.mê) Tiltengî. Bêhintengî. |
| **Tengezar** | (hn,hk,.l.çewa) Rê liber mirovî winda di bit. Perîşan. Tengav. |
| **Tengezarbûn** | (k.jn.l.mê) Tengavbûn. Perîşanbûn. |
| **Tengezarî** | (n.dar.mê) Tengavî. Perîşanî. Bêrêyî. |
| **Tengezarkirin** | (k.jn.l.mê) Perîşankirin. Bê ser û rê kirin. Rê li ber berze kirin. |
| **Tengijîn** | (k.hn.mê) bn :Tingijîn. |

| | |
|---|---|
| **Tengî** | (n.dar.mê) Tiştê teng. : Jiber tengîya pêlavê pêyên min birîndar bûn. Br× Firehî. |
| **Tengkirin** | (k.jn.l.mê) Cilik, kun, der, yê fireh; bi hêt têkbirin, biçûkirin. : Min şelwalê xwe da teng kirin ji ber ku yê fireh bû. Br× Firehkirin. (K) bn: kirin. |
| **Tenik** | (hk.x.çewa) Tiştê ne stûr. Zirav. Perê tenik, kaxeza tenik, dîwarê tenik. Banê tenik. |
| **Tenikbûn** | (k.jn.l.mê) Tişt tennik di bit. (K) bn: Bûn. |
| **Tenikî** | (n.dar.mê) Tiştê tenik. Nazikî. Ziravî. |
| **Tenikkirin** | (k.jn.l.mê) Renîn û kolana tiştî yan erdî ta tenik di bit. (K) bn: Kirin. |
| **Tenişt** | (n.x.mê) Kêlek. Rex. Al. |
| **Tenî** | (n.x.mê) Rengê reş yê ji kadîya agirî peyda di bit û bi tiştan ve di mînit. |
| **Tenîbûn** | (k.jn.l.mê) Tenîgirtin. |
| **Tenîgirtin** | (k.jn.l.mê) Dema tiştek heyamekê li bin dûkêlê bi mîne, tenî liser xirve di be û reş di be. (K) bn: girtin. |
| **Tenîkirin** | (k.jn.l.mê) Êxistina goşt û tiştan li bin kadîyê tanî tenî di girit. Tenî tê dan.(K) bn: kirin. |
| **Tenîtêdan** | (k.jn.gl.mê) Tenîkirin. |
| **Tenîper** | (n.l.mê) Kaxeza karbonî. |
| **Tenûr** | (n.x.mêr) Amêrê pêvedana nanîye,nemaze sawik, li cihekê kûr û deshil asê di kin,nava wê valaye agirî di navda hil di kin ta gerim di be,ji axa cerikan hatî çêkirin. |
| **Tenya** | (hn,hk.x.çewa) bi Tinê. Êkane. |
| **Tep** | (n.x.mê) ***deng*** Dengê lêdaneka hêhî bi destî li mil yan pişta yekî. Dengê destê mirovî wekî bi henek ve li yekî di din.Mista nazik. |
| **Tepanê** | (n.dar.mê) ***lîstik*** Bi gokê lîztin. Yarîyên bi gokan |
| **Tepanêkirin** | (k.jn.l.mê) Lîztin[ yarîkirin] bi gokê. (K) bn: Kirin. |
| **Tepe** | (n.x.mê) Goka lîztinê. :Pêhnek li tepê da. |
| **Tepedor** | (n.dar.mê) Dervankek biçûke ji pirteka darê xav hatî çêkirin di kin di derê bitilan da şileyên nav da ne rêjin. Tebedor. |
| **Tepên** | (n.dar.mê) Dengê tep lêdanê. şepên. :Te destê xwe li zikê wî da tepên jê hat. |
| **Tepik** 1 | (n.dar.mê) 1. Girikên hevîr, teqin, yan rîxê. 2. Gok. Tepe. |
| **Tepik** 2 | (n.x.mê) 1.Xefka ji beran hatî çêkirin jibo girtina çûçik û tewalan. 2. Xapandin. |
| **Tepikvedan** | (k.jn.gl.mê) Dema tepikek di hêt vedan dako berhev bit jibo girtina tewalan. 2. Tepik liber yekî vedan,ang; nexşne danan jibo daweşana gurzekî dijî wî. |
| **Tepisandin** | (k.jn.dar.mê), tepişandin Pestkirin û di navêkda birin. (K) Bdn: Ez, em, tu, hun, ew, ewan. Di tepisînim, tepisînîn, tepisînî, tepisînit[…ne], tepisînin.PR bn: Bdn+ [dê]. Bdb: di tepisand, di tepisandin. Db,dûr: tepisandibû,…bûn.(F) : bi tepsîne, bi tepisînin. |
| **Tepisandî** | (hk.dar.çewa) Hatî tepisandin. |

| | |
|---|---|
| **Tepisîn** | (k.jn.mê) Pelişîn. Herişîn. |
| **Tepîn** | (k.jn.mê) Tepisîn. |
| **Teqalk** | (n.dar.mê) 1. Pirteka girover û tenik, mîna meyîkan. 2. Corekê şekirokane. |
| **Teqandin** | (k.jn.mê) Peqandin. (K) Bdn: Ez di teqînim em di teqînîn, tu di teqînî hun di teqînin, ew di teqîne[…it] ewan di teqînin.Pr : Dê [bi] Teqînim. Bdb : Di teqand. Di teqandin. Db,dûr : Teqandibû,.. bûn. (F) : bi teqîne, bi teqînin. |
| **Teqe** | (n.x.mê) Dengê teqêna tivengan. Pevçûnên. |
| **Teqekirin** | (k.jn.l.mê) Gule berdan hev. Tiveng û top teqandin. Teqeka baş li dujminî kirin û paşî paşve zivirîn. |
| **Teqên** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengê peqînê. Dengê vêkkevtina tenên req, dergeh, darbirînê û htd. |
| **Teqin** | (n.x.mê) Qur. Kur. Herî. |
| **Teqîn** | (k.jn.x.mê) Peqîn. |
| **Teqteqoşk** | (n.l.mê) Demance, debanceyên zarokan. |
| **Ter** | (hk.x.çewa) 1. şil. 2. Nû. Taze. Nazik. 3. Hişîn. BR× Hişk. Zuha. |
| **Teratî** | (n.dar.mê) Cih yan tiştê ter bit. Bi av. Avdar. : Teratî di vî erdî da heye. :Teratîya devî. |
| **Terazin** | (n.x.nêr) Evrazî. |
| **Terazî** | (n.x.mê) 1. Amêrê pîvanê ye.2. Navê stêrekêye. |
| **Terazû** | (n.x.mê) bn :Terazî. |
| **Terbî** | (n.avêsta.x.mê) Fêrbûn. Çavdêrî. |
| **Terbîbûn** | (k.jn.l.mê) Fêrbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Terbîkirin** | (k.jn.l.mê) Perwerdekirin. Fêrkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Terbûn** | (k.jn.l.mê) şilbûn. : Cilikên min li ber baranê ter bûn. (K) bn: Bûn. |
| **Tere** | (n.dar.mê) Giyayên bi terî dihên xwarin, wek kerfs, reşadok, pîng û htd. |
| **Terecan** | (n.l.çewa) Nazik. Ciwan. Ter |
| **Terektir** | (n.l.biyan.mê) Mekîna kêlana erdî. |
| **Teremast** | (n.l.nêr) Mastê jibo zivistanê parastî [hilgirtî]. |
| **Tereqî** | (n.x.mê) ***fêqî*** Rengekê xoxane, di hilîne. |
| **Teres** | (hk.x.çewa) Gotineke mirov jibo hevdu sivikkirinê bikar dihînin. Dijûneke. Civîne. Pûç.Çepel. |
| **Tereşiwat** | (n.l.mê) Roja dawî a meha şiwatê. ***Pend*** :Tereşiwatê, gîskî xwe havêt latê. ang; ber bi biharê ye. |
| **Terezin** | (n.dar.mê) Baxçe. Cinîk. |
| **Terg** | (n.x.mê) Gijloka gir. |
| **Terim** | (n.x.nêr) Laşê mirî. Kelex. |
| **Terimbûn** | , bûne terim (k.jn.l.mê) Bûn kelex.(K) bn : Bûn. |
| **Terimkirin** | (k.jn.l.mê) kirin terim. Kujtin. (K) bn: kirin. |
| **Teriqîn** | (kjn.x.mê) 1. Revîn. Bazdan.2. bi Dawî hatin, nemaze yarîya perkanê. |
| **Terî** | (hk.x.çewa) Teratî. |
| **Terkirin** | (k.jn.l.mê) şilkirin. Av pêdakirin. (K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Terme** | (n.x.mê) Cihê rûniştinê li bihar û havînan ku di kevit ber derê malê.Hewş. Bersivk. |
| **Termêmexîl** | (n.l.nêr) ***stêrnasî*** bn :Termênihê. |
| **Termênihê** | (n.l.nêr) ***stêrnasî*** Heft stêrin li esmanan wek mînakê hirçeka mezin xuya di kin. ***Pend*** : Di çîvanokan da hatîye; herkesê heft caran vê gotinê bi bêje û bêhina xwe ne hilkêşe dê çite beheştê. :Termê nihê, nih li piştê, heçîyê heft caran bêjit, dê çit beheştê. |
| **Terq** | (hk.x.çewa) Hesin, dar, ber û htd yê sertûj. |
| **Teşik** | (n.x.pir) Ling. Pê. |
| **Teşî** | (n.x.mê) Amêrekê destîye jibo ristina bendikan ji hirî yan mûyan bikar dihêt. |
| **Teşîrês** | (n.l.dz) Mirovê [piranî jin] yê bi teşîyê bendikan di rêsit. |
| **Teşîrêsk** | (n.l.mê) ***balinde*** Corekê teyrane li bilindahiyê di rawestit. |
| **Teşîristin** | (k.jn.l.mê) Diristkirina [ristina]bendikan bi teşîyê (K) bn : Ristin, rêsan. |
| **Teşqelçî** | ( n.l.dz) Xapînok. |
| **Teşqele** | (n.x.mê) Xapandin. Serdabirin. |
| **Teşqelekirin** | (k.jn.l.mê) Xapandin. Direw lêkirin. Serdabirin.(K) bn : Kirin. |
| **Teşt** | (n.x.mê) Amaneke dan û mitayî tê dixin. Test. |
| **Teter** | (karn.dz) 1. Kesê nameyan di gehîne. Posteçî. 2. Navê mêrane. |
| **Tev** | (hk.çewa) Hemû. Gişt. |
| **Teva** | (hn.çewa) Tev. |
| **Tevayî** | (n.dar.mê) Tebayî. Bi Hevre. |
| **Tevbûn** | (k.jn.l.mê) bn :Tevîbûn. |
| **Tevda** | (hk.dar.çewa) Bi hevre. Pêkve. |
| **Tevdan** | (k.jn.l.mê) Têkhelkirin. Têkelkirin. :Ka û ceh tevdan jibo xwarian kerî. |
| **Tevde** | (hk.dar.çewa) Tevda. |
| **Tevdêr** | (n.dar.mê) Makîna çêkirina şîlavê ji fêqî, yan hûrkirina giyayî. |
| **Tevger** | (n.dar.mê) 1. Bizav.2. Navê xor û keçane. |
| **Tevin** | (n.x.nêr) 1. Davên raçandî jibo vehandin û çinîna cewal, werîr, berik û htd. 2. Davên raçandî yêd mala tevinpîrkê. |
| **Tevinkirin** | (k.jn.l.mê) Çêkirina tevinî. Danana tevinî.Raçandina tevinî. (K) bn: Kirin. |
| **Tevinpîrk** | (n.l.mê) ***candar*** Core giyandarekê biçûke, tevinî di ke. |
| **Tevir** | (n.x.nêr) Amêreke jibo kolana erdî bi kar di hêt. :Bîstan bi tevirî kola. :Xepare bi tevirkî kir. |
| **Tevizandin** | (k.jn.mê) Mirov serê candarekî yan mirovekê bin av bi ke ta bêhna wî çik di be. |
| **Tevizîn** | (k.jn.mê) Di bin avê ve fetisîn. |
| **Tevî** 1 | (n.x.mê) Baran. Barîna bireka baranê. :Duhî tevîyeka baranê li gundê hat co rabûn. |
| **Tevî** 2 | (hk.x.çewa) Tev. Tevda. Bi hevra. :Emê tevî wan herim dîlanê. |
| **Tevîbûn** | (k.jn.l.mê) Pişikdarbûn. :Supasîya te di kin ko tu tevî ahinga me bûyî.(K) bn : Bûn. |
| **Tevkar** | (hk.dar.çewa) Alîkar. Piştevan. |

| | |
|---|---|
| **Tevkarî** | (n.dar.mê) Alîkarî. |
| **Tevkirin** | (k.jn.l.mê) Têkhlkirin. Di nav êk da kirin. |
| **Tevlihev** | (hk.l.çewa) Di nav yekda. Têkel. |
| **Tevlihevbûn** | (k.jn.gl.mê) Têkelbûn. |
| **Tevlihevî** | (hk.l.çewa) Aloz. Alizî. Têkel. |
| **Tevlihevkirin** | (k.jn.gl.mê) Têkelkirin. |
| **Tevlîbûn** | (k.jn.l.mê) Pişikdarbûn. :Em tevlî aheinga jinînana wî bûyn.(K) bn: Bûn. |
| **Tevşî** | (n.x.nêr) Tevirkê daran. Qeraşeyê tiraşîna daran.: tevşîyê berê xweye. Ang; her tişt bo xwe di vê. |
| **Tevşo** | (n.x.nêr) bn :Tevşî. |
| **Texe** | (n.x.mê) Deste. Pêç. Tilxe. Texa befirê, texa çilî, texa kaxezan û htd. |
| **Tew** | (peyv.kevin.xweş) Gotineke guhdar daxaza leşsaxîyê jibo dengbêj yan lawikbêjî di kin dema disirit .ang ; Pîrozîya xwedayê tavê. |
| **Tewal** | (n.x.mê) Balinde. Firinde. Teyr.Wala. |
| **Tewalêt** | (n.biyan.mê) Daşir. Avrêj. |
| **Tewandin** | (k.jn.x.mê) Jibo rûmetgirtin mirov xwe di çemînit.Çemandin. Xwe şorkirin. :Em bejin a xwe li hemberşehîdên Kurdistanê di tewînin. (K) :Bdn ez, em, tu, hun, ew,[ewê], ewan. Di tewînim, tewînîn, tewînî, tewînin, tewîne, tewînin.. PR : Dê[bi] + bdn. Bdb : Di tewand, di tewandin. Db, dûr: tewandibû,.. bûn. . (F) : Bi tewîne, tewînin |
| **Tewil** | (n.x.mê) Pinîya mezin |
| **Tewilkirin** | (k.jn.l.mê) Girêdana dewaran li cihê çerandinê. :Hesp tewil kir. :Hêstirê tewil bi ke. (K) bn: Kirin. |
| **Tewilkirî** | (hk.l.çewa) Hatî tewilkirin. :Kerê tewilkirî. |
| **Tewilxane** | (hk.cih,n.l.mê) Cihê tewilkirina dewaran. |
| **Tewîk** | (n.dar.mê) Dengûdoreke guhdar di ber lawikgotinêra di bêjin daku dîwan gerim bibit û gêwilê stiranbêjî vebibit. |
| **Tewîkdan** | (k.jn.l.mê) Guhdarên stiran û lawikan tewîkan di din. (K) bn: Dan. |
| **Tewrat** | (n.x.mê) Kitêba pîroz ya dîna cihûyan. |
| **Texe** | (n.x.mê) Çîn.Cîn. :Texa çilî, texa axê. Tûtina texe. :Texa paleyan. :Texa karkeran. |
| **Text** | (n.x.nêr) Çirpê nivistinê. Çirpê xewê. |
| **Texte** | (n.x.nêr) Dep. Dar. |
| **Textebend** | (n.l.nêr) Text yan kenepeyê liser rûniştinê. |
| **Textebendkirin** | (k.jn.gl.mê) Dîwar, doşk, ban û htd parçeyên depan lê di din jibo ciwanî tunbûnê. Depebendkirin. |
| **Textekab** | (n.l.mê) Textikê kompyoterî, çendîn kabikan liser rêzkirîne, wek ; pît, hijmar, çeveng û htd. |
| **Textereş** | (n.l.nêr) Depekê pan û reşe [yan rengên din] li xwendingehan, jibo liser nivîsanê bi kar di hêt. |
| **Texterewan** | (n.l.mê) Kursîka xirxal bi binî ve û mirov di kare jibo her alî bi zivrîne. |
| **Textik** | (n.dar.nêr) 1. Depekê lakêşeyî ye, bi pêpike, goşt û giyayî liser hûr di kin. 2. Textê biçûk. |

| | |
|---|---|
| **Teyfî** | (n.x.nêr) *fêqî* Corekê tirîye rengê wî sorekê vebîye. |
| **Teyr** | (n.x.nêr) Tewal. Wala . balinde. ***Pend*** :Teyrê nêçîrê dimik xare. |
| **Teyrok** | (n.dar.mê) Terg. |
| **Teysandin** | (k.jn.dar.mê) Birîskandin. Hilûkirin. : Min pêlava xwe bi reng lêdanê ya teysandî.(K) bdn : ez di teysînim em di teysînîn, tu di teysînî hûn di teysînin, ew di teysîne[...it] ewan di teysînin. Pr :dê[bi]+bdn. Bdb : di teysand, di teysandin. Db,dûr : teysandibû, teysandibûn. (F) : bi teysîne, bi teysînin. |
| **Teysîn** | (k.jn.x.mê) Biriskîn. Birisqîn. : teneke ji dûr di teysit(berd,dn). Enîya wî di teysa (db). |
| **Teysok** | (n.dar.mê) 1.Kaxedeka taybetîye yahilûye,di teyse.2. ***candar*** Stêrok. |
| **Tezandin** | (k.jn.x.mê) 1. Sarkirin. Qerisandin. 2. rawestandin. 3. kujtin.(K) Berd,dn: ez, em, tu, hun, ew, ewan.[Di] tezînim,tezînîn,tezînî,tezînin,tezînit[…ne], tezînin. PR: dê [bi] bn: Berd,dn. Berd.db : di tezand, di tezandin. Db, dûr: tezndbû,..bûn. |
| **Teze** | (hk.x.çewa) bn: Taze. |
| **Tezekirin** | (k.jn.l.mê) bn: Tazekirin. |
| **Tezî** | (hk.x.çewa) Gelek sar. Ava tezîang; ava gelek sar. |
| **Tezîbûn** | (k.jn.l.mê) Sarbûn. Qerisîn. :Fêqî di kir di nav avtezînkê da da tezî bi be.(K) bn: Bûn. |
| **Tezîkirin** | (k.jn.l.mê) Sarkirin. Qerisandin. :Avê tezî bi ke da vexoyn.(K) bn: Kirin. |
| **Tezînk** | (n.dar.mê) 1. Tezîbûneke ji egra , tirsê, serma yan şermê bi ser giyanê mirovî da di çit. 2. Pê yan destê mirovî di qerimit, yan di nivit dema li bin giranîyekê di mînit. |
| **Tezînkgirtin** | (k.jn.l.mê) Dema dest yan pîyê mirovî di teze. Qerimîn.: Tezînkê pêyê min yê girtî. |
| **Tê** | (hk.cih) 1. Di gelda. Di navda. Têda. Di wê[wî]. Jê. 2. Rû. Rex. Al. Tî. |
| **Têbahî** | (n.dar.mê) Qonaxeke dema rûnahî û qebarê heyvê kêm di bit. |
| **Têbar** | (n.xdar.mê) 1.Xîça ji egera lê çûna tenekî çê di bit. Aûp. Aûnpê. : Têbara dirûnê liser perokî ya diyare.2. Pirsgeh. |
| **Têbirin** | (k.jn.l.mê) Ji navbirin. Éxistinê. Toşkirin. (K) bn : Kirin. |
| **Têbînî** | (n.l.mê) Rûnkirin liser mijarekê. Diyarkirina bûçûnan. Nêrîn. |
| **Têçûn** | (k.jn.mê) 1. Di navda çûn. Kunkirin. Simtin. 2. Jinav çûn. Toşbûn. Mirin. 3. Lê mezaxtin : Çêkirina tirombêlê 200 dînar têçûn. Xanîyê te çend tê çû?.(K) bn : Çûn. |
| **Têda** | (hk.cih) Di navda. : Di tirobêlêda. Di malda. :Kirmê di nîva qurmê darê da. |
| **Têdaman** | (k.jn.l.mê) Mirov di nav tiştek, cihek yan karekî da bi mînit.: Tu çi di kî di wê çalê da? ezê mayîm têda nikarim bi hême der. (K) bn: Man. |
| **Têdanan** | (k.jn.l.mê) Li ser danan. Dapoşîn. Li rex danan. Siwarbûn. :Lingên xwe (li hespî danan) têdanan ;ang siwarbû.(K) bn : Danan. |
| **Têderînan** | (k.jn.l.mê) Têbînîkirin. Hestpêkirin. : Min tê ne îna der ku ew yê nexweşe. (K) Derînan. |

| | |
|---|---|
| **Têderxistin** | (k.jn.l.mê) Têderînan. (K) bn : Derxistin. |
| **Têderxistinok** | (n.l.mê) Tiştîk. Mamik. |
| **Têgeh** | (n.dar.mê) Tiştê mirov tê di gehit. Raman. |
| **Têgehandin** | (k.jn.l.mê) Mirov karekî yan gotinekê jibo yekî zelal bikit tanî werdigirit.(K) Bdn: Ez tê digehandim em tê digehandîn, tu tê di gehandî hun tê di gehandin, ew tê di gehand ewan tê di gehandin. PR: Dê tê [bi] gehînim, gehînîn, gehînî, gehînin, gehînit[…he], têgehînin. Bdb: Tê[di] gehandim, gehandîn,gehandî,gehandin.gehand. Db,dûr: Tê gehandibû,…bûn. (F): tê bigehîne, tê bigehînin. |
| **Têgehiştin** | (k.jn.dar.mê) Tişt, gotin, kar û htd li cem mirovî zelal bit. (K) bdn: Ez tê di gehim em tê di gehîn, tu tê di gehî hun tê di gehin, ew tê di gehit[…he] ewan tê digehin. PR: Dê tê [bi] gehim, gehîn, gehî, gehin, gehit[…he], gehin. Bdb: Tê di gehiştim,gehiştîn, gehiştî, gehiştin, gehişit,gehiştin. Dr, dûr: Tê gehiştbû,…bûm, bûy, bûyn, bûn. (F) : tê bigehe, tê bigehin. |
| **Têhavêtin** | (k.jnl.mê) Jê derkevtin. : Avê di cilikên min havêt. (K) bn : Havêtin. |
| **Têhelhatin** | (k.jn.l.mê) Karîne tiştekî. Aiyanê. Xwe di ber girtin.: Ev karekê girane, ez tê helnahêm.ang; ji min nahêt pê rabim. (K) bn: Hatin |
| **Têhilandin** | (k.jn.l.mê) Tiştek, amanek xistin nav avê yan şilekî. : Airînê gozik di avê hiland. :Min parî di metfînîyê hiland.(K) bn: Hilandin. |
| **Têhilavêtin** | ( k.jn.l.mê) bi Hêz havêtina şileyekê bo serî. : têhilavêtina bilqên avê.(K) bn: Hilavêtin. |
| **Têhildan** | (k.jn.dar.mê) 1. Têkelkirin. Bi Nav da kirin. Pêwerkirin. 2.Lêdan. Qutan. |
| **Têhilkêşan** | (k.jn.l.mê) Derzîyeka tîj di perokek yan tiştekê nerim ra bi key û tê bi çit. (K) bn : Hilkêşan. |
| **Têhin** | (n.x.mê) 1. Germîya leşî. Germîya av, şîr, madeyên gaz û req.2. Hêz. Bizav.Aiyan : Têhina karebê. Ang; hêza karebê. |
| **Têhinşîr** | (hk.l.çewa) Têhina wek ya şîrê taze ji giyandaran di doşin. Germîyeka kêm. |
| **Têhinşîrbûn** | (k.jn.l.m) Dema madek pîçek gerim di bit. Wek têhina şîrî. (K) bn: Bûn. |
| **Têhinşîrkirin** | (k.jn.l.mê) Gerimkirin tanî têhinşîr di bit. (K) bn: Kirin. |
| **Têhisîn** | (k.jn.l.mê) Vêkra anîna du tiştan daku hilû yan gerim bi bin. Ji serma destêd xwe têk(di êk) hisîn. :Desteberk di dîwarî hisîn. |
| **Têjik** | (n.x.mê) Zaroyên gineweran. : têjikên balindeyan. |
| **Têk** | (paşg.çewa) Di êk. Di hev. Bi hevre. Di nava êk da. |
| **Têkalan** | (k.jn.l.mê) Li dor êk zivirîn. Hevgirtin. :Destên wan têk alan.(K) bn: Alan. |
| **Têkalandin** | (k.jn.l.mê) Du yan pitir [bendik, ta, çeq, û htd] di dor hev alandin û girêdan. (K) bn: Alandin. |
| **Têkbirin** | (k.jn.l.mê) Di nav hevda birin. Givaştin tanî qebare biçûk di bit. (K) bn: Birin. |
| **Têkborandin** | (k.jn.gl.mê) Di ber êk ra borandin. Di ser hev ra derbaz kirin. (K) bn :Borandin. |

| | |
|---|---|
| **Têkçûn** | (k.jn.l.mê) Qebare biçûkbûn. Cilik bi şûştinê têk diçin. Ang; biçûk di bin. (K) : Çûn. |
| **Têkdan** | (k.jn.l.mê) Jinav birin. Wêrankirin. Xerakirin. Herifandin. (K) bn: Dan. |
| **Têkder** | (hk.dar.çewa) Mirovê durû. Ajaweçî. Xirabkar. |
| **Têkel** | (hk.dar.çewa)Du cûn, du tişt, du reng, yên cuda bi ken di navêk da.Têkhel; Bi hevre. Tebayî. Di navêk da. |
| **Têkelbûn** | (k.jn.l.mê) Çûn navêk. : Genim û ceh yên têkel bûyn. Kar û bizin têkelbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Têkelî** | (n.dar.mê) 1. Di navêkda. 2. Peywendî. :Min têkelî di gel wî nîne. Govenda têkelî,ang; govenda ji jin û mêran pêkhatî. Re_belek. |
| **Têkelîkirin** | (k.jn.l.mê) Peywenîkirin. Hevalînîkirin. Hevbendîkirin.. ***Pend*** :Têkelîya keçan neke, çunkî di vehêlin, ya bîjinan neke, bi find û fêlin. (K) bn: Kirin |
| **Têkelkirin** | (k.jn.l.mê) Éxisin nav hevda. Navêkkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Têkevtin** | têketin(k.jn.l.mê) Toşbûn. Kevtin kirasê şermê. (K) bn: Ketin[kevtin] |
| **Têkgirêdan** | (k.jn.l.mê) Bi hevre girêdan. :Dewar têkgirêdan,ang; pêkve gîrêdan. Qentarkirin. Mirov têkgirêdan,ang; destên wan bi hevre bestin, girêdan. (K) bn: Girêdan. |
| **Têkirin** | (k.jn.l.mê) 1.Tiştek, xwarinek, vexwarinek û htd vala kin amanekî. Ça tê kir. Ça rêjt [kir] peyalê[kop]. : avê têke tirarî.2. Li kêmî dan. Lewazbûn.(K) bn : kirin. |
| **Têkoşer** | (rd.dar.çewa) Mirovê jibo dozeka hejî xizmetê dike. Xebatker. Xebatkar. |
| **Têkoşîn** | (k.jn.dar.mê) Xebatkirin. : Azadîya li Kudisanê berê têkoşîna gelê kurde. (K) Bdn: Ez tê di koşim, em tê di koşîn, tu tê di koşî hun tê di koşin, ew tê di koşe ewan tê di koşin. PR : dê tê[bi] bn : Bdn. Bdb : tê di koşîm, tê di koşîn,di koşî, tê di koşîn, di koşî, di koşîn. Db,dûr : tê koşîbûm, bû,.bûy, bûyn, bûn. (F) :tê bi koşe, tê bi koşin. |
| **Têkra** | (hk.dar.çewa) 1. Bi hevra. Pêkve.2. Di navêkda. Tirar yên têkra. |
| **Têkraman** | (k.jn.gl.mê) Di navêkda man. Pêkveman. |
| **Têkûpêkdan** | (k.jn.gl.mê) Têkdan. Pirtikandin. |
| **Têkûpêkkirin** | (k.jn.gl.mê) Hatîye têkdan. |
| **Têkvedan** | (k.jn.l.mê) 1. Keviçikek yan darek di nava [xwarin, ça, şile, derman û htd] bi hêt livandin û gêran ta têkelî hev bi be. Ailqandin. (K) bn : Dan.[ vedan]. |
| **Têkwerandin** | (k.jn.l.mê) Destên xwe di stoyê hev alandin. (K) bn: Werandin. |
| **Têkwerbûn** | (k.jn.l.mê) 1. Gêjbûn. Kevtin. 2.Têkalan. (K) bn: Bûn. |
| **Têkwerkirin** | (k.jn.l.mê) Xwe havêtin yek. Hevdu himbêzkirin.: Pa_ çendîn salan hevdu ne dî tibûn, xwe têkwerkirin.(K) bn: Kririn. |
| **Têl** | (n.x.mê) Têle, Davên ji hesinî çêkirîn. Tayên asinî. |
| **Têlbend** | (n.l.mê) Tan, perjan, pero û htd yê bi têlê hatî girêdan. |
| **Têlbendkirin** | (k.jn.gl.mê) Cih yan tiştê bi têlê peyt kirî. (K) bn: Kirin. |
| **Têldirk** | (n.l.mê) Têleya ji dirik û stirîyan hatî çêkirin. Sîme. |
| **Têldirkkirin** | (k.jn.gl.mê) Sîmekirin. |

| | |
|---|---|
| **Têle** | (n.x.mê) 1. Dava hesinî. Sîm. 2. Toq. Berbisk. |
| **Têlefon** | (n.dar.biyan.mê) Telefon, Amêrê peywendîkirinê. Amêrê hevbendîyê. |
| **Têlefizyon** | (n.dar.biyan.mê),telefizyon, Amêreke jibo bihîstin û dîtina deng û rengan. |
| **Tên** | (n.x.mê) Têhin. |
| **Tênan** | (k.jn.l.mê) 1. Têkirin. Dagirtin. 2. Kutan. |
| **Tênik** | (n.dar.mê) Tênîbûn.: Tênika min bi xoşavê[şerbet] na şikê. |
| **Tênivîsan** | (k.jn.dar.mê) bi Nivîsan nav û nîşanên xwe dane tomarkirin. |
| **Tênivîsîn** | (k.jn.dar.mê) bn :Tênivîsan. |
| **Tênî** | (hn.x.çewa) Têhnî, Candar,mirov hişînkatî pêdvî bi avvexwarinê di bit.pêdvîya leşî jibo avê. ***Pend*** :Tênî li avê di gerit.ang; divê mirov bi xwe li dû karê xwe bi keve. |
| **Tênîbûn** | (k.jn.l.mê) Dema Candar û darûbar pêdvî vexwarinê bi be. (K) bn: Bûn. |
| **Tênîkirin** | (k.jn.l.mê) Av nedan tanî mirov, candar yan giya tênî di be. (K) bn: Kirin. |
| **Tênoşkî** | (hk.dar.çewa) Mirov gelek avê vedixwe û tênika wî naşikêt. |
| **Tênoşkîbûn** | (k.jn.l.mê) Ji avvexwarinê têr nebûn. (K) bn: Bûn. |
| **Tênoşkîkirin** | (k.jn.l.mê) Hêlan tênî. |
| **Têper** | (rd.dar.çewa) ***rêzman*** Derbaz.Dema derbaz. |
| **Têperîn** | (k.jn.dar.mê) Derbazbûn. |
| **Têr** 1 | (hk.x.çewa) Mirovê, candarê xwarin xwarî û êdî pêdvî bi zadî nebe. ***Pend*** :Têrî hay ji [yên] birsî nîne. |
| **Têr** 2 | (n.x.mê) Cihalê duta, li pişta dewaran dikin.Cewal. ferde. |
| **Têraçûn** | (k.jn.l.mê) 1. Têçûn..: Kelemek di çavê hespî ra çû. 2. Di direkê ra derbazbûn[çûn]. : Pişîk di kuleka xanî ra çû jûrê.(K) bn: Çûn |
| **Têrakirin** 1 | (k.jn.l.mê) Tiştekê sertîj di cihekî bi kin ko tê biçit. Têqutan.:Aûjin di cihalî ra kir. :Sing di erdî ra kir. |
| **Têrakirin** 2 | (k.jn.l.mê) Xwarin, vexwarin, pare û htd di berfireh bin û kêmasî têda nebe.: :Zadê mişeye, têra me hemûyan di ke. :Perê min têra rêka hatinûçûnê nake.(K) bn: Kirin. |
| **Têraman** | (k.jn.l.mê) 1. Tiştê tîj ku çûye di cihekî ra der ne kevit. Bi mînit têda. Di navda man :Stirîyekê maye di tibla min ra. 2. Zengînbûn. (K) bn: Man. |
| **Têrbûn** | (k.jn.l.mê) 1.Mirov têr xwarinê di xwe û tê di be. 2. Ji karekî, kiryarekê, bêzar bûn. :Min zad xwar ez têrbûn.(K) bn: Bûn. |
| **Têrkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov xwe ji karekî, bi zadî xwarinê tê di kit. (K) bn: Kirin. |
| **Têrmal** | (rd.l.çewa) Zengîn. Heyî. |
| **Têrmeh** | (hk.dem) bn:Tîrmeh. |
| **Têrxwarin** | (k.jn.l.mê) Gelek xwarin. Xwarin ta têr bi be. Ma têrxwarine ?. |
| **Têşt** | (n.x.mê) Zadê sipêdê. Xwarina sipêdê. |
| **Têştegeh** | (n.dar.mê) 1.Têşt ya berheve. Gehiştîye. Dema têştê. 2. Cihê xwarina tiştê. |
| **Têştexew** | (n.l.mê) Nivistina piştî têştê. |
| **Têştexewkirin** | (k.jn.gl.mê) Nivistin piştî têşê. :Ez herroj têştexewan di kem. |

| | |
|---|---|
| **Têvekirin** | (k.jn.l.mê) Dijûndan. Civîdan. ***Pend*** :Hindeka mirine, hindeka têvekirine. (K) bn: Kirin. |
| **Têwerandin** | (k.jn.l.mê) Tê alandin. : Dest di stoyê wî werand. :Dest di gerdenê werand. (K) bn: Werandin. |
| **Têwerbûn** | (k.jn.l.mê) Kevtine nav. (K) bn: Bûn. |
| **Têwerdan** | (k.jn.l.mê) 1. Jaravkirin. Bijînkirin. : Av di devê xwe werda. 2. Matêkirin. : Nabit hûn dest di karûbarên welatê me werdin. (K) bn: Dan. |
| **Têwerkirin** | (k.jn.l.mê) Berek darek û htd bi havêjî yekî. Havêtin.. : Xwe di hevdu werkirin, ang; Xwe havêtin hevdu. :Kevirek di gurî wer kir. |
| **Têxistin** | (k.jn.l.mê) Xistin nav. Toşkirin. Têkelkirin. |
| **Têz** | (n.x.mê) Barît. Barût. |
| **Têzav** | (n.l.mê) Tirşî. Ava tîj. :Têzava patirîya tirombêlê ya kêm bûy. |
| **Tibar** | (n.dar.mê) Demsal. Werzê salê. |
| **Tibil** | (n.x.mê) ***can*** Tilîyên destan. Tilî.Til. |
| **Tibilçav** | (hk.l.çewa) Aeva tarî ko mirov tibilan di çavên êk bi ken, hevdu na bînin. Tarîstan. :Aeveka hinde tarîye, tibilçave. |
| **Tibir** | (hk.x.çewa) Zîx. Peyt. Zîrek. Çeleng. |
| **Tif** | (n.x.mê) Aileya devê mirovî.***Pend*** :Tifa serevraze,ang; mirov bi destê xwe ziyanê li xwe bi de. |
| **Tifdan** | (k.jn.l.mê) Bi tifê terkirin. Tifkirin. |
| **Tifkirin** | (k.jn.l.mê) Av yan Aileya devî havêjtin, kirin. :Tif li tiştekî dan. (K) bn : Kirin. |
| **Tifnebûn** | (k.jn.l.mê) Pêtîbûna berên dîwaran û weryan. Hilweryana keviran. (K) bn:Bûn. |
| **Tift** | (hk.x.çewa) Tama tal. Tal. |
| **Tijî** | (hk.x.çewa) Pir. Mişt.: Tirarê tijî av. Birka tijî. |
| **Tijîbûn** | (k.jn.l.mê) Pirbûn. :Perdax ji avê tijî bû.(K) bn: Bûn. |
| **Tijîkirin** | (k.jn.l.mê) Pirkirin :Berîka xwe tijî mêwîj kir.(K) bn: Kirin. |
| **Tike** | (n.x.mê) ***xwarin*** Pişkên goştê birajtî. |
| **Tikên** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengê lêdana pilan. |
| **Til** 1 | (n.x.mê) Tilî. Tibil. :Dest ji pênc tilan pêk di hêt. ***Pend***: Tilên destan ne wek hevin. ang; her mirovekî sincek taybetî heye. |
| **Til** 2 | (n.x.nêr) Kêlek. Tenişt. Tilk. :Debance bi tilê xwe ve kir. |
| **Tilî** | (n.x.mê) 1. Tiblên destî. 2. Libên tirî. :Tilîya tirî. |
| **Tilîdirêj** | (hk.l.çewa) Jina tilîyan wê di dirêj û xweşik. |
| **Tilîfîşek** | (n.l.mê) Coreke ji tirîyê reş, tilîyêd wî di dirêjin. Corekê reşwêwî ye. |
| **Tilîkêşan** | (kjn.gl.mê) Weke tilîyên tirî ji ûşî di kêşin.(K) bn: Kêşan. |
| **Tilîlî** | (n.dar.mê) Dengûdoreke ji devê mirovî nemaze jina derdikevit bi hilkeftinên dilveker hinde caran jî nexweşîyan. |
| **Tilîlîvedan** | (k.jn.l.mê) Tilîlî gotin. (K) bn: Dan. |
| **Tilînaz** | (hk.l.çewa) Mirov, xasime jina tilî ciwan û nazik. |
| **Tilînîşan** | (n.l.mê) Tibla navbera beran û nîvê. |
| **Tilove** | (hk.dar.çewa) Pir. Tijî. Gurî.:Gotina te ji çewtîyan tilove. |

| | |
|---|---|
| **Tilxe** | (n.x.mê) Texe.:Tilxeka befirê. :Tilxeka parey. |
| **Tim** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo berdewamîya rûdanan bi kar di hêt.Herdem. Hergav. Êkcar. Her. |
| **Timûtim** | (pêrb.l) Tim. |
| **Tinê** | (hk.x.çewa) Tenê. ***Pend*** :Tinê jibo xudê başe. |
| **Tinêbûn** | (k.jn.l.mê) Digel kesê nebûn. : Duh ez li mal bi tinê bûm. (K) bn: Bûn. |
| **Tingijîn** | (k.jn.x.mê) Torebûn. Hêrisbûn. (K) bdn: ez di tingjim, emtingijîn tingijî, tingijin,tingijit[….je], tingijin. Pr: Dê[bi], + bdn. Bdb : ez di tingijîm em di tingijîn,tu di tingijî hûn di tingijin, ew di tingije[…it] ewan di tengijin. Db,dûr : tingijîbûm,.bûy,.bû,.bûn. (F) : bi tingije, bi tingijin. |
| **Tinoke** | (n.x.mê) Dilop. Çipik. |
| **Tipên** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengê vêkkevtina du tenan yan kevtin : Kitik di banîda kevt, tipên jê hat. |
| **Tiptip** | (n.dar.mê) *deng* Dengê pêyan. Teptep. Tipên. |
| **Tiptipkirin** | (k.jn.gl.mê) Dengê tiptipê jê hatin. |
| **Tir** | (n.x.mê) 1.Bayekê bi denge, ji paşîyê derdikevit. Piv.***Pend*** :Tira meye, sira [nepenî] meye. 2. Paşbendeke jibo hevberkirineka pêtir bi kar di hêt : gelek, gelektir, ciwan ciwantir, pîs pîstir û htd. Gelek. |
| **Tirane** | (n.x.mê) Kiryar û gotinêd ne ji dil. Henek. Gelte. Yarî. |
| **Tiraneker** | (hk.dar.çewa) Yarîker. Bingelte. :Xortê tiraneker. :Jina tiraneker. |
| **Tiranekirin** | (k.jn.l.mê) Henekkirin. :Bibore ez tiranan di kem. (K) bn: Kirin. |
| **Tiranê** | (n.dar.mê) ***yarî*** Lîztineke zarok bi daran di ken. Dartiranê. |
| **Tiranêkirin** | ( k.jn.l.mê) Yarîya tiranê kirin. : Gelê gencan werin da tiranê bi kin.(K) bn: Kirin. |
| **Tirar** | (n.x.nêr) Badî. :Tirarê avê. |
| **Tiraş** | (n.x.mê) Darên qurm û qedên wan mezin nabin. Kêrat. |
| **Tiraşîn** | (k.jn.x.mê) Birîna mûyan. Ser, rih, simbêl, dar û htd Kurkirin. (K) bdn: ez, di tiraşimem di tiraşîn, tu di tiraşî hûn di tiraşin, ew di tiraşe[…it] ewan di tiraşin. Pr : dê [bi]+ bdn. Bdb : di tiraşî, tiraşîn. Db, dûr : tiraşîbû,…bûn. (F) : bi tiraşe, bi tiraşin. |
| **Tirb** | (n.x.mê) Gor. Ziyaret. |
| **Tirbistan** | (n.dar.mê) Goristan. |
| **Tireqên** | (n.dar.mê) ***deng*** Têqên. |
| **Tirên** | (n.x.mê) 1. Aemendefir. 2. ***deng*** Dengê makînan, tirombêlan. 3. Dengê zikçûnê. |
| **Tirik** | (n.dar.nêr, mê) 1. Hej. :Tirik komkirin dako agirî berdenê.2. Tira biçûk. |
| **Tirikîn** | (k.jn.x.mê) Zayîna dêhlan (sega mê). :Dêhlik ya tirikî, heft kûçik înane. |
| **Tiringên** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengeke, mîna dengê lêdana tenekan. |
| **Tirî** | (n.x.nêr) ***fêqî*** Fêqîyekê, ûşîyan di dit ji liban pêk di hêt. berê mêwê ye. Gelek cor û reng hene, mîna zerik, reşmêw, teyfî, mîranî û htd, zer, reş. |
| **Tirîrûvîk** | (n.l.mê) ***giya*** Core fêqîyekê kûvîye mîna tirîye, rûvî di xon. |
| **Tirken** | (n.dar.dz) Yê tiran di ke. |

| | |
|---|---|
| **Tirkirin** | (k.jn.l.mê) Kirin û derêxistina bayê bi deng, ji paşîyê. Pivkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Tirk** | (nejn) Mirovê ji netewa tirkan. |
| **Tirkiye** | (welatn) Welatê tirkan. |
| **Tirkî** | (n.x.mê) Ziman, mita, yên ji Tirkiye. |
| **Tirombêl** | (n.x.mê) Amêrek mezin, mirov jibo veguhaztina mirov û baran bi kar di hînin , gelek cor û reng hene. |
| **Tirozî** | (n.x.nêr) ***giya çandin*** Corekê fêqîye, dirêje rengê wî keskekê vebîye, wek aroyane. |
| **Tirpan** | (n.dar.mê) Aaloka dirûnê ya mezin, destikek dirêj heye, miro da di weşîne giyayîû pê di rûn.. |
| **Tirs** | (n.x.mê) Hestkirin bi tirsanê. Bi karên bive.:Karê bi tirs. :Dengê bi tirs.:Ji tirsan di lerzî. |
| **Tirsan** | (k.jn.x.mê) Hestkirin bi rûdanên ne xuristî, ko dê karek bi serê mirovî hêt. (K) bdn: ez di tirsim em di tirsîn,tu di tirsî hûn di tirsin, ew di tirse[…..it] ewan di tirsin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : ez di tirsam, em di tirsan, tu di tirsay, hûn di tirsan, ew di tirsa, ewan di tirsan. Db,dûr: tirsabûm,.bûyn,.. bûy,...bû,..bûn. (F) : bi tirse, bi tirsin. |
| **Tirsandin** | (k.jn.dar.mê) Mirov yekî bi tirsîne. :Te ez tirsandim !. (K) bdn : ez di tirsînim, em di tirsînîn, tu di tirsînî, hun di tirsînin, ew di tirsîne[….it], ewan di tirsînin. PR : dê[bi]+ bdn. Bdb : di tirsand, di tirsandin. Dr, dûr: tirsandibûm,.. bûy,.. bûyn,..bû,.. bûn. (F) : bi tirsîne, bi tirsînin. |
| **Tirsinok** | (hk.dar.çewa) Tirsonek. Tirstirsok. ***Pend*** :Tirsinok be, jî dirêj be. |
| **Tirsî** | (hk.x.çewa) Hişk.Zuha .Zuwa : Firavîna evro nanê tirsîye.ang; nanê zuwa û bi tinê. |
| **Tirsonek** | (hk.dar.çewa) Mirovê pir di tirse. Tirsinok. Tirstirsok. |
| **Tirstirsok** | (hk.dar.çewa) Tirsonek. |
| **Tirş** | (hk.x.çewa) Tameke, mîna ya; simaqê. Tama tirîyê ne gehiştî. ***Pend*** :Tirşê bi nîvî, jê neke hîvî. |
| **Tirşbûn** | (k.jn.l.mê) Dema xwarin gemar di be,tama wê tirş di bit. Bi têxistina simaq û xwarinên tirş, zad tirş di be. (K) bn : Bûn. |
| **Tirşik** | (n.dar.mê) ***xwarin*** Zadeke, şileyeka bi giyaye, reng sor yan sadeye û kutilkan tê di kin. |
| **Tirşî** | (n.dar.mê) Xiyar, kelemî, tirozî û htd di gel tirşî vedigirin ta tirş di bin, di gel zadî di xon. |
| **Tirşkirin** | (k.jn.l.mê) Xwarinê bi têkirina simaq yan tama tirş, tirş di kin. :Avemastê tirş bi ke da tamxweş. |
| **Tirşkirî** | (hk.l.çewa) Hatî tirşkirin. :Zelata tirşkirî pir bi tame. |
| **Tirşok** | (n.dar.mê) ***giya*** Giyayek belg pane, reng keske, wekî beqlî ye,tama wî tirşe. |
| **Tirtire** | (hk.dar.çewa) Kirêt. Peritî. Bêserûber. |

| | |
|---|---|
| **Tirtirî** | (hk.dar.çewa) 1.Kesê ko nikarit gotinên xwe bi diristî bi bêjit jiber têkalîna devê xwe. Devtitirî.2.Mirovê dengbilindê lewçe û gelek cirebirê di ke. ***Pend*** :Ne ewrê girgirî, ne mêrê tirtirî. |
| **Tirxan** | (hk.dar.çewa) Qelew. :Mêrekê tirxan. :Jineka tirxan. :Berxekê tirxan. |
| **Tiryan** | (n.x.mê) Seleke ji levenan çêkirîye nanî dixin nav.Zilînka nanî. Îşkev. ***Pend*** :Tiryanka nanî ji biçûkan ra, dîha çilî ji gîskan ra. |
| **Tisî** | (hk.x.çewa) bn :Tirsî. |
| **Tişt** | (n.x.nêr) Tenên nenas. Tenên bê giyan. :Ew çi tişte di destê te da?. |
| **Tiştîk** | (n.dar.nê) Gotinên ne diyar û bi awayê helbest li civatê di hên gotin bi mînakên şêlî, mebest jê tiştekê ne diyare, ka kî dê bi zanit çîye. Têderxistinok. Mamik. ***Mamik*** :Ez çûme ji vêrê pêda,min karwanek dî di rêda, maka di zikê têjikê da.( bersiv: Tovika gundorî) . ***Mamik*** :Tiştîkê min tiştanî, bê pê di çe ser banî.(bersiv: dûkêl, dûman). |
| **Tivandin** | (k.jn.x.mê) Yê xwe tivandî,ang; xwe keşxe kirîye. Ciwankirin. Xemlandin. Tivtivandin. (K) bdn: ez di tivînim em di tivînîn, tu di tivînî hûn di tivînin, ew di tivîne[…it] ewan di tivînin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb : di tivand, di tivandin. Db,dûr: tivandibû, tivandibûn. (F): bi tivîne, bi tivînin. |
| **Tiveng** | (n.x.mê) *çek* Çekeke bi agirî di teqit û guleyan di hêjit. |
| **Tivên** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengekê zirave mîna dengê kêz, mêş, pêşî û |
| | berikên tivengan. |
| **Tivir** | (n.x.mê) ***giya*** Core giyayekê bi serike, tama wî tîje, gelek cor û reng hene, belg û serikên wî di gel zadî di xon. |
| **Tivîr** | (n.x.mê) Tevin. |
| **Tivîrk** | (n.x.dz) ***perinde*** Balindeyeka kûvîye, mîna kotirane. |
| **Tivtivkirin** | (k.jn.gl.mê) Dengê tivênê jê hatin. :Pêşî tivtivê di ket. (K) bn: Kirin. |
| **Tixar** | (n.x.nêr) Gonîyeke jibo têkirin, kêşan û pîvana danî tê bi kar anîn û ji ferdan mezintire. |
| **Tixare** | (n.dar.mê) Hêsil. |
| **Tixe** | (hk.x.çewa) Gemar, pîs bi zimanê zarokan. |
| **Tixûb** | (n.x.nêr) Xîçeke du cihan ji hev cuda dike. ***Pend*** :Çîv stûre, tixûb dûre, çîv zirave tixûb ave. :Tixûbê zevîya me û apê min bi hevraye. |
| **Tixûbdanan** | (kjn.l.mê) Diristkirina tixûban di navbera erdan da. :Dagîrkeran di nav welatê me da tixûb danan. (K) Danan. |
| **Tixûbdar** | (hk.dar.çewa) Cihê, gotina hatî tixûbkirin.rade bo hatî danan. |
| **Tixûbdarkirin** | (k.jn.gl.mê) Radek jibo hatî danan. Tixûbek jibo danaye. (K) bn: Kirin. |
| **Tixûbkirin** | (k.jn.l.mê) Çêkirina tixûban.(K) bn : Kirin. |
| **Tixûbkirî** | (hk.l.çewa) Hatîye tixûbkirin. Tixûbdar. |
| **Tizbî** | (n.x.pir) Risteka morikane mirov di destê xwe di girit, nexasim sofî, jibo nizayan bi kar di hînin. |
| **Tî** 1 | (hk.cih,n.x.nêr) Rex. Tenişt. Per: Tîyê rojê derkevt. |
| **Tî** 2 | (n.x.nêr) Birayê mêrê jinê tiyê wê ye. : Tîyê Hîvîyê mêvanê meye. Hêwer. |

| | |
|---|---|
| **Tî** 3 | (n.x.mê) Darfêqî bn: Tû, twî. |
| **Tîj** | (hj.x.çewa) Tama tûj, wek bîberên tûj.2. Amêrên serê wan zirav. Terq.Dijwar.3. Mirovê tîj,ang; Zîx. Peyt. Çespan. |
| **Tîjatî** | (n.dar.mê) 1.Tama tîja xwarinan mirov bi ezmanî di zane. Dijwarî. Harî. : Tîjatîya sîrê ne wek ya pîvazê ye. |
| **Tîjav** | (n.l.mê) Têzav. |
| **Tîjbûn** | (k.jn.l.mê) 1. Xwarin bi têkirina tiştên mîna bîberan, catirk û htd tûj di bit. 2. Hisîn û xweşkirina devên amêran wek das, bivir, kêr û htd. (K) bn: Bûn. |
| **Tîjkirin** | (k.jn.l.mê) 1. Tiştên tîj di xin nav zadî.2. Xweşkirina kêr,das, û bivran da tûj bi bin. :Ev zade bi têkirina bîberan tîj kirîye. (K) bn: Kirin. Tîjkirî (hk.l.çewa) Hatîye tîjkirin. :Darê tijkirî. :Gilçê tîjkirî. |
| **Tîk** | (n.x.mê) Derzeka biçûk. Gikestineka biçûk. Derz:Tîkeka kevtîye dîwarî. Tîkeka kevtîye vî kevirî. |
| **Tîkbûn** | (k.jn.l.mê) Dîwar, der di derzin. Derizîn.:Ev bane tîk bûye. (K) bn: Bûn. |
| **Tîkkirin** | (k.jn.l.mê) Derzandin. Tîk êxistinê. |
| **Tîm** | (n.x.biya.mê) Deste. |
| **Tîmsah** | (n.biyan) ***candar*** Candarek hi_kavî xi_oke, hêkkere, devek mezin didanên tîj hene jibo girtina nêçîrê. |
| **Tîn** | (n.x.mê) Tên. Têhin. Hêz. |
| **Tîndar** | (hk.dar.çewa) Bi hêz. Peyt. Lêkdayî. |
| **Tîp** | (n.x.mê) 1. Pît. 2.Yekeyeka leşkerî. |
| **Tîpkirin** | (k.jn.l.mê) Çapkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Tîqîn** | (k.jn.x.mê) Tîqlîqkirin. |
| **Tîqlîq** | , tîqtîq (n.dar.mê) ***deng*** Dengê kenîya bilind. :Ev çi tîqlîqe, ma hûn ji xwe fedî nakin?. |
| **Tîqlîqkirin** | (k.jn.gl.mê) Kenîn bi tîqlîq ve. : Ka bêje min ew çi tîqlîqe tu di kî?. (K) bn: Kirin. |
| **Tîr** 1 | (n.x.mê) Asin yan darek ê zirave û serê wî tîje, bi kivanî di havêjin. |
| **Tîr** 2 | (hk.x.çewa) Gileyên çir, ne ron. : Ev metfînîye gelek ya tîre. Mastê tîr. Avika tîr. ***Pend*** :Ya tîra di binî mayî. Ang ; gotin, kiryara giring hêjta maye. |
| **Tîravêj** | (pîşn.l.dz) Mirovê tîran di havêje. |
| **Tîrbaz** | (kar.dar.dz) Tîravêj. |
| **Tîrbûn** | (k.jn.l.mê) Weke şileyek tîr di be.Çirbûn. :Gelek temate kir nav metfînê jiber hindê tîr bû. (K) bn: Bûn. |
| **Tîrêj** | (n.dar.mê) 1. Tîyê rojê. Tîrojkên rojê. Davên ronahîya rojê. 2. Navê xort û keçane. |
| **Tîrhavêj** | (pîşn.l.dz) Kesê tîran di havêjit. |
| **Tîrhavêtin** | (k.jn.l.mê) Mirov tîran di havêje.(K) bn: Havêtin. |
| **Tîrik** 1 | (n.x.mê) Tayên daran jibo çandinê berhev kirîn. :Cotyarî sed tîrikêd mêwan di erdî kirin(çandin). |
| **Tîrik** 2 | (n.dar.nêr) Tîrê biçûk. Tûrik. :Tîrik ê dew, mastî. |

| | |
|---|---|
| **Tîrkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov şileyekê tîr bi ke. Ava xwarina kêm bi be, xwarin tîr di be. (K) bn: Kirin. |
| **Tîrmeh** | (hk.dem) Meha heştê ji salê. Meha dawîya havînê. ***Pend***:Tîrme(tîrmeh) tirî hate ber me. |
| **Tîroj** | (n.l.mê) Tîrojk.Tîyê rojê.Rexê rojê. Perê rojê. Davên ronahîya rojê. |
| **Tîrweşandin** | (k.jn.l.mê) Tîrhavêtin. (K) bn : Weşandin. |
| **Tît** | (n.x.mê) Perçeyên zêrî, jin liser enî yan singa xwe girê di din. |
| **Tîtelo** | (hk.dar.çewa) Xir. Girovir. |
| **Tîtik** | (n.dar.pir) Fêqîyê nû ji pijkovkê derkevtî û hêjta ne gehiştî. Tîtika xiyarî. : Xiyarên kevtîne tîtikan, tîtik yên dayn. |
| **Tîtilk** | (n.x.mê) Zîlikê hedamê guhnelî yê tuxmê mê.Zîlik. |
| **Tîtin** | (n.x.mê) Tûtin. |
| **Tîtirîn** | (k.jn.l.mê) Seg li ser kudkê xwe radiwestit. Rûniştina seyan. |
| **Tîvil** | (n.x.nêr) Tîvkil. |
| **Tîvkil** | (n.x.mê) Pişka bergê qurm, ta, çeq, fêqî û htd, da di poşt.Tîvkilê sêvê, mozê, xiyarî. Qelp. |
| **Tîx** | (n.x.mê) 1. Xîç. Hêl. Tîr. 2. Texe. Cîn. |
| **Tîzab** | (n.l.nêr) Ava dijwar. Ava tîj. Ava tirş. Tîjav. |
| **Tîzav** | (n.l.mê) Tîjav. |
| **Tîzmar** | (n.l.nêr) ***candar*** Kirmên axê. |
| **Tob** | (n.x.mê) Gurzekê pêçayî yê peroyan.Tobê perokan. |
| **Tobe** | (n.biyan.mê) Hêlan. Ji karên ne ba_ dûr kevtin. |
| **Tobedar** | (n.dar.dz) Kesê karên çewt hêlane. |
| **Tobekirin** | (k.jn.l.mê) Mirov dest ji xirabîyan ber di de. (K) bn : Kirin. |
| **Tofan** | (n.x.mê) Çamên xwezayî, mîna bahoz, barove, lehî û htd. Lêhmişt. Çam. Malwêranî. |
| **Tol** | (n.x.mê) Bersivdana her xurtîyeka li mirovî di hêt kirin. |
| **Tolajo** | (karn.dar.dn) Mirovê tolê ve di ke. Tolveker. |
| **Tolaz** | (hk.x.çewa) Xort. Genc. Law. |
| **Tolgirtin** | (k.jn.l.mê) Tolvekirin. |
| **Tolhilandin** | (k.jn.l.mê) Tolvekirin. (K) bn: Hilandin. |
| **Tolhildan** | (k.jn.l.mê) Tolvekirin.(K) bn: Hildan. |
| **Tolik** | (n.x.mê) ***giya*** Giyayekê biharîye di hêt xwarin. |
| **Tolikvan** | (karn.dar.dz) Mirovê tolikê di çinit, nexasim jin. |
| **Tolveker** | (karn.dar.dn) Tolajo. |
| **Tolvekirin** | (k.jn.l.mê) Heyfsitandin. Bersivdana bi tundî.: Pêşmegeyan tola şehîdan ji dujminî vekirin. (K) bn: Vekirin. |
| **Tomar** | (n.x.mê) Peyv, gotin û gotarên nivêskî yan wênekirî. |
| **Tomargeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê yan avahîyê taybet jibo tomarkirina deng, reng û nivîsan. |
| **Tomarkirin** | (k.jn.l.mê) Wergirtin û parastina dengan, nivîsan û wêneyan. (K) bn: Kirin. |
| **Tomav** | (n.l.nêr) Tovê mirov û candarên nêr. Tovê mêran. Spêrma. |

| | |
|---|---|
| **Tomik** | (n.x.nêr) Danê genim, ceh, yan mitayên dî, di din mirî_k û tewalan. |
| **Top** | (n.x.mê) 1. ***çek*** Çekekê mezine di karên leşkerîda dijî hevdu bi kar dihînin.2. Tepe.3. Peroyê ne vekirî. Topekê perokan. |
| **Topanê** | (n.dar.mê) *yarî* Lîztina bi tepanê. Gokanê. |
| **Topanêkirin** | (k.jn.l.mê) Yarîkirin bi tepê.(K) bn: Kirin. |
| **Topbaran** | (n.l.mê) Barana guletopan li ser cihekî.Lêdana topan. Havêtina topan. |
| **Topbarankirin** | (k.jn.gl.mê) Guletop berdan ser deverekê. : Dujminî gundên kurdan topbaran kirin.(K) bn: Kirin. |
| **Topberdan** | (k.jn.l.mê) Tophavêtin. |
| **Tophavêtin** | (k.jn.l.mê) Topan li cihekî di reşînin. (K) bn: Havêtin. |
| **Topiz** | (n.x.nê) Darekê serê wî stûre jibo berevanîyê mifa jê werdigirin. Çîv. |
| **Topîn** | (k.jn.x.mê) Sikitîn. Mirin. |
| **Toplîztin** | (k.jn.l.mê) Topanêkirin. |
| **Toq** | (n.x.mê) Asinekê biçûke jin pora xwe pê di girin. Têle.Berbisk. |
| **Toqandin** | (k.jn.x.mê) Kujtina xelikê bêguneh. Tîrorkirin. |
| **Tor** | (n.x.mê) 1.Davên raçandî jibo girtina masîyan bi kar di hêt. Tora masî yan tewalan.2. Janên berîya zarokbûnê. |
| **Torandin** | (k.jn.x.mê) Torekirin. |
| **Tore** 1 | (hk.x.çewa) Sîl. Hêris.Tengav. :Ew herê toereye niza bûçî?. |
| **Tore** 2 | (n.x.mê) Honer.Rewişt. Tîtal. Hêja. Sinc. |
| **Torebûn** | (k.jn.l.mê) Silbûn. Hêrisbûn. Tengavûn.: Tore ne be, ez henekan di kim. (K) bn: Bûn. |
| **Torekirin** | (k.jn.l.mê) Tengavkirin. Hêriskirin. Silkirin. : Xwe tore neke. : Kurî babê xwe tore kir. :(K) bn: Kirin. |
| **Torevan** | (kar.dar.dz) Garezayê warên helbest, çîrok, pexşan û htd. |
| **Torîn** | (hk.x.çewa) 1. Gox. Geng. Ciwan.Naz. 2. Navê jinane. |
| **Torvan** | (karn.dar.dn) Nêçîrvanê bi torê masî ya tewalan di gire. |
| **Toşbûn** | (k.jn.lmê) Têkevtin. (K) bn: Bûn. |
| **Toşkirin** | (k.jn.l.mê) Êxistin davan. Xapandin. :Te ez toş kirim. (K) bn: Kirin. |
| **Tov** | (n.x.nêr) 1.Dan, dindikên mitayî. Tuxmê candaran, bi çandin yan bergirtinê nivşê xwe di parêze.:Tovê genim, ceh, nok û htd. 2. Nivş. Tuxim. |
| **Tovça** | (n.l.mê) bn :Ça. |
| **Tovdank** | (n.l.mê) Tûreke tovî tê dixin. :Cotkarî tovdank li milê xwe kir û çû nav zevîyê. |
| **Tovhavêtin** | (k.jn.l.mê) Tovê mitayî di havêjin erdî jibo hişîn bi be.. (K) bn: Havêtin. |
| **Tovik** | (n.dar.mê) 1. Danê mitayê mîna gulberojan, kulindan û htd ko hatîne qelandin jibo xwarinê. 2. Tov. |
| **Tovkirin** | (k.jn.l.mê) Zevî, erd hatîye çandin bi tovî. :Cotkarî tovê genim bi zevîyê wer kir. :Zevî xwe hêjta tov ne kirîye.(K) bn: Kirin. |
| **Tox** 1 | (hn.x.çewa) Tîr. Çir. Br× Gelal. :Rengê tox. |
| **Tox** 2 | (n.x.mê) Ala. |
| **Toz** | (n.x.mê) Bayê bi ax û qirş. Ar. Arik. Hûrik. |

| | |
|---|---|
| **Tozbûn** | (k.jn.l.mê) Peydabûna tozê. Bûne toz. |
| **Tozkirin** | (k.jn.l.mê) Karekî li ser axê bi kin toz peyda di be.(K) bn: Kirin. |
| **Tu** 1 | (cih) ***rêzman*** Cihnavê kesê duwê yê tek. :Tu kurê kêyî? Eve tuyî?. ***Pend*** :Tu bi keran re bi gerî dê zirî, bi mirovan re bi gerî dê peyvî. ***Pend*** :Tu mîna berîya bi kelpîşka xwe nerazî. |
| **Tu** 2 | (pêr.alv,ne) ***rêzman*** Alaveke jibo neyîkirinê bi kar di hêt. Çune. : Ez tu caran çakîya te ji bîr nakim. |
| **Tuberk** | (n.x.mê) Pîroz. |
| **Tucarî** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê vebirînê. Çi caran. :Ew tuçarî ne çûye Kurdistana azad. |
| **Tune** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê neyîkirinê. Nîne. Çine. :Perê min tune. |
| **Tunebûn** | (k.jn.l.mê) Neyînî. Nebûn. (K) bn: Bûn. |
| **Tunekirin** | (k.jn.l.mê) Direw derêxistin. Pûçkirin. :Gotina rojnamevanî tune kir.(K) bn: Kirin. |
| **Turk** | (nej.n.x.dz) Mirovê nejad turk. |
| **Turkî** | (hn.dar.nej,n)Ziman, tişt û mitayê ji Turkya. |
| **Turkuman** | (nej,n.) Neteweyeke. |
| **Turkumanî** | (n.dar.mê) Zimanê turkumanan. |
| **Turkumanistan** | (hk.cih,cugr,n.dar.mê) Welatê turkumanan. |
| **Turkya** | (hk.cih,cugr,n.x.mê) Welatê turkya. |
| **Tursik** | (n.dar.nêr) Mamik. Helamet. |
| **Tursikîn** | (k.jn.x.mê) Bazdan. Revîn. |
| **Tuxim** | (n.x.mê) Nivş. |
| **Tuxûb** | (n.x.nêr) Xîçeka du yan pitir erd,zevî, gund, bajar û welatan jihev cuda di ket.Tuxûbê zevîya me û ya we di gel hevin. Tixûb. |
| **Tû** | (n.x.mê) ***dar & fêqî*** Fêqîyekê şirîne, sipî û reş in, bi dara tûyê ve dihên. Twî. |
| **Tûb** | (n.dar.mê) Deste. Gurz.Tûbik. :Tûbekê kaxezan. |
| **Tûfirengî** | (n.l.mê) ***fêqî*** Corekê tûyane bina wan giyayîye, reng sore,tam şirîne. Tûya erdî. |
| **Tûj** | (hn.x.çewa) Tîj. |
| **Tûjandin** | (k.jn.mê) Lêgeran. Li Pey geran. Dîvçûv. Vekolîn. :Tûjandina zanînî. |
| **Tûjbûn** | (k.jn.l.mê) Tîjbûn. |
| **Tûjkirin** | (k.jn.l.mê) Tîjkirin. |
| **Tûk** | (n.x.mê) ***tewal*** 1. Balindeyeke li daristanan di xwînit, selîqa wî mîna navê wîye(tûk).2. Perên baldaran, yên nerim. |
| **Tûl** | (n.x.nêr) Perdeya tenik ya pencer û deran. |
| **Tûr** | (n.x.nêr) Torbe. Mişot.Têrik. |
| **Tûqesp** | (n.l.mê) ***dar*** Tûyên sipî. |
| **Tûreşk** | (n.l.mê) ***dar*** Corekê dar tûyane, tûyên wan di reşin. |
| **Tûşemb** | (n.l.mê) ***dar*** Corekê tûyane, rengê wan di reşin. |
| **Tûtandin** | (k.jn.mê) Liser kodikan danan. Tîtirîn. |
| **Tûtik** | (n.x.mê) 1.Corekê nanîye. Sawik. 2. Zeratîya tirozîyan. |

| | |
|---|---|
| **Tûtin** | (n.x.mê) ***giya*** Giyeke hişk di ken, bi cigare yan qelûnê di kêşin. Cigare. |
| **Tûtî** | (n.x.mê) ***perinde*** Balindeyeke. Pepexa. |
| **Twî** | (n.x.mê) Tû. |

# U

| | |
|---|---|
| **U** (u) | Pîta bîst û pêncê ji abeya kurdî. |
| **Ucre** | (n.x.mê) Sindoq. |
| **Unda** | (hk.x.çewa) Berze. Winda. Hinda. |
| **Undabûn** | (k.jn.l.mê) Berzebûn. Hindabûn. Windabûn.(K) bn: Bûn. |
| **Undakirin** | (k.jn.l.mê) Berzekirin. Hindakirin. Windakirin. (K) bn: Kirin. |
| **Urdo** | (hk.cih,cugr,n.x.) Bajêrkeke di keve kinarê başûr ê derya reş ko tixûbê welatê kurdane. |
| **Umerî** | (malb) Navê tîreyeka kurdane. |

# Û

| | |
|---|---|
| **Û** 1. | (û) Pîta bîst û şeşê ji abeya kurdî. |
| **Û** 2. | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pêvegir. :Ez û tu. Evro û sube. Par û pêrar. Jin û mêr. Ba û baran. Xwarin û vexwarin. Dayk û bab û htd. |
| **Û** 3 | (pêrb) ***rêzman*** alavê hodeng(hd,bangkirin) gazîkirinê : û şivano![ wa şivano] |
| **Û**4 | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pisyar û misogerîyê ye. Pa. : û eve çîye ?[pa ev çîye?]. |
| **Ûçik** | (n.x.nêr) Hiçik. |
| **Ûde** | (n.x.mê) Mezel. Jûr. |
| **Ûlî** | (n.x.mê) Koçik. Xanî. Bêla. Vîla. |
| **Ûlo** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê nîşadana karek, rêyekê. Wilo. Wesa. |
| **Ûrdek** | (n.x.dz) ***perinde*** Balindeyekê hişkavî,malî û kûvî ye. Werdek. |
| **Ûrdî** | (n.x.mê) Leşker. |
| **Ûrdîgeh** | (hk.cih,n.dar.nêr) Leşkergeh. |
| **Ûremar** | (hk.cih,cugr,n.dar) Devereke li Kurdistan bakûr.Hozeke. |
| **Ûremarî** | (malb.dar.dz) Xelkê Üremar. |
| **Ûris** | (nej,n.x.dz) Ros. |
| **Ûrisî** | (n.dar.mê) Ziman û kelûpelên rosî. |
| **Ûtêl** | (n.x.mê) Mêhvanxane. |
| **Ûtî** | (n.x.nêr) Amêrê hilûkirin û ciwankirina cilan. |
| **ûtîkirin** | (k.jn.l.mê) Hilûkirina cilan bi amêrê ûtî. |
| **Ûx** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo kovanê yan hicmetîbûnê bi kar di hêt. |
| **Ûy** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê keser û janan. |

# V

| | |
|---|---|
| **V** | (ve) Pîta bîst û heftê ji abeya kurdî. |
| **Va** | (cihn) Ev. Eve. Va çîye ?. Va ye hevalê min. |
| **Vaca** | (rd.x.çewa) Vajî. Berevajî. |
| **Vagon** | (n.x.biyan.mê) Fergonê tirênê(şemendefir). |
| **Vajî** | (hk.x.çewa) Kiras, cilik, tûrik yên vajî.ang ; alê nav hatîye derve û bervajî. |
| **Vajîbûn** | (k.jn.l.mê) Dema cil, gore yan tiştek berê wî di kevit nav û nava wî di kevit serve. |
| **Vajîkirin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov cilikekê xwe vajî di ke. |
| **Vala** | (hk.x.çewa) Cihê vala. Ang ; cihê çi têda nîne.kes di navda nîne. Bê. Xilole. :Xanîyê vala. :Gozikê vala. :Serê vala ; ang bê[mirov, av, mejî].BR× Pir, tijî. |
| **Valabûn** | (k.jn.l.mê) Amanek vala bibe. Ang ;derêxistina av yan her tiştê têda . (K) bn: Bûn. |
| **Valahî** | (n.dar.mê) Cihê tu tişt, kes yan candar di nav da be bin. |
| **Valakirin** | (k.jn.l.mê) Rûkirin. Têda ne hêlan. :Cihorkê xwe vala kir. :Xanî vala bi ke.(K) bn : Kirin. |
| **Valayî** | (n.dar.mê) Gerdûn. Xilole. Valahî. |
| **Van** | (pêrb.pir) ***rêzman*** Alavê nîşadana tiştê nêzîk yê pirînî .:Van cilan bi ke ber xo ,gelek ji te di hên. :Van rojan dê mizgînîyeka xweş bo me hêt. Evan. Br× Wan. |
| **Vana** | (pêrb) 1. ***rêzman*** Alavê nişêdana nêz. Evana. Van.2. Navê jinane. |
| **Varê** | (hk.x.çewa) Veder. Dûr. Ji rê derkevtin. |
| **Varêbûn** | (k.jn.l.mê) Vederbûn. Piçek dûrkevtin. (K) bn: Bûn. |
| **Varêkirin** | (k.jn.gl.mê) Weke mirov yekî ji cihek yan rêyekê ji mirovan dûr bêxe di gel da bi peyve ko kesê dî guhdarîya gotinên mirovî neke. (K) bn:Kirin. |
| **Varik** | (n.x.nêr) Candarê yek salî. Candarê xort. ***Pend*** :Gotin kewî çi cih xweşe; go cihê lê bûym varik. |
| **Vavartin** | (k.jn.x.mê) Tiştê qenc ji yê xirab cuda di kin.Ji hev cihêkirin. Ji hev cudakirin. Bijartin.(K) bdn: ez di vavêrim em di vavêrîn, tu di vavêrî hun di vavêrin, ew di vavêre[…it] ewan di vavêrin. Pr : dê [bi] + bdn. Bdb : di vavart, di vavartin. Db,dûr : vavartibû,vavartibûn. (F): bi vavêre, bi vavêrin. |
| **Ve** | (paş,pêş,pirt) ***rêzman*** Pêşpirt û caran paşpirte, bi kirinan(kiryar) ve girêdaye jibo dubare û çend bare kirinê. :Hateve. :Zivrîve. Çûve. Veçinîn. Vebirîn. Vedan û htd. |
| **Vebijartin** | (k.jn.dar.mê) Vewijartin. |
| **Vebir** | (n.dar.mê) 1.Heyameka kurt. Navbir. Bêhinvedaneka kurt.2. Delîve. |
| **Vebirandin** | (k.jn.mê) Vebirîn. |
| **Vebirî** | (hk.dar.çewa) Kurtkirî. Dawî hatî. |

| | |
|---|---|
| **Vebirîn** | (k.jn.l.mê) 1. Kutakirin. Bi dawî anîn. 2. Berhevkirin.Biryar li ser dan. :Nextê bûkê vebirî.ang ; berhev kir û biryar liser da.(K) bn : birîn. |
| **Vebiryan** | (k.jn.l.mê) Jinav çûn. Qirbûn.bi êkcarî biryan.(K) bn : Biryan. |
| **Vebûn** | (k.jn.dar.mê) Tiştê girtî ve di bit. Dergeh vebû, birîn vebû, gul ve di bit, devê wî vebû. (K) bn : Bûn. |
| **Vecemandin** | (k.jn.dar.mê) Xirvekirin. Komvekirin. Li hev cemandin. :Hevanêt xo vecemandin. :Xêzana xwe vecand. (K) bn: Cemandin. |
| **Veciniqandin** | (k.jn.dar.mê) Tirsandin.. :Hesp veciniqand. (K) bn:Ciniqandin |
| **Veciniqîn** | (k.jn.dar.mê) Ji tirsan lerzîn. Ji nişkê ve tirsan. ::Dewar ji tirombêlan di veciniqin (K) bn: Ciniqîn. |
| **Vecûn** | ,Vecwîn (k.jn.dar.mê) Xwarin bi didanan hûrkirin û înan û birin. Axivtin du,sêbarekirin. (K) bn : Cûn. |
| **Veçinîn** | (k.jn.dar.mê) 1.Belkirin. Mûçkirin. Repkirin.: Hespî guhên xwe veçinîn.2. Dubare çinîn. Dubare ristin. Têkalizîn.(K) bn: Çinîn. |
| **Veçirandin** | (k.jn.dar.mê) Rûtkirin. Bi Penc û nînokan cilik hincinîn. :Hestî veçirand,ango; goşt bi hestîyan ve ne hêlan. :Pora xwe di veçirî,ang ; pora xwe bi pencan di kêşa. |
| **Vedan** | (k.jn.dar.mê) 1. Xwe jê dûr xistin. Xwe dane alekî. Vekirin. Peytkirin. Berevajîbûn. :Eng veda. Berhevkirin. :Telhek veda. :Tepik veda.2. Lêdan. Lêxistin. Pêvedan. (K) bn: Dan. |
| **Veder** | (hk.dar.çewa) Ne pêra. Ne di gel. Cuda. Cihê. :Mirovek veder. |
| **Vederbûn** | (k.jn.l.mê) Cudabûn. (K) bn : Bûn. |
| **Vederkirin** | (k.jn.l.mê) Cudakirin. Jêgirtin. : Wî xwe jinav mirovan veder kir, ang; Jinav mirovan derkeft. (K) bn: Kirin. |
| **Vedirûn** | (k.jn.dar.mê) Cihekê vebûyî yan diryayî dubare bi hêt dirûn.: Dê şelwalê xwe vedrût. (K) bn: Dirûn. |
| **Vedizîn** | (k.jn.dar.mê) Bi dizîve ji civatekê, cihekî dûr kevtin. :Çûneka bêy tu kesê ageh ji mirovî hebe. (K) bn: Dizîn. |
| **Vedîtin** | (k.jn.dar.mê) Tiştê hidabûyî careka din mirov bi bîne. : Supas bo xudê min careka dî tu dîtî ve.(K) bn: Dîtin. |
| **Vedor** | (n.dar.mê) Qonax. Heyam. Gav. |
| **Veger** | (n.dar.mê) Zivrîn. Vegeryan. Hatin. :Roja vegera hevalê min ji biyansitanê. |
| **Vegerandin** | (k.jn.dar.mê) Kelûpel yan tiştên mirovî ji yekî wergirtîn , bo xwedîyê wan bi zivrînit. Dubare lê zivrndin. :Ew kitêba min dabû te, jibo min vegerîne.(K) bn: Gerandin. |
| **Vegerîn** | (k.jn.dar.mê) Vegeryan. |
| **Vegeryan** | (k.jn.dar.mê) Dubre zivrîneve. : Ew ji derve vegerya ye Kurdistanê. (K) bn: Geryan. |
| **Vegirtin** | (k.jn.dar.mê) 1. Dema yek tiştekî bi havêt û mirov li esmanan bi destan wergirit. Yan tenek ji bilindayîyekê bi hêt xarê, yek bigire pêş bi keve erdî. :Sêvek ji darê keft, min vegirt. 2. Xwrin di amanan da hilgirtin dako tama wan xweş bi bit. 3. Dagîrkirin. Girtin. (K) bn: Girtin. |

| | |
|---|---|
| **Veguhartin** | (k.jn.dar.mê) Wergêran. Wergerandin. :Ji zamanekî bo yê dî veguhart. |
| **Veguhaztin** | (k.jn.dar.mê) Ji cihekî bo yê din birin. :Bûk veguhast. (K) bn: Guhastin. |
| **Veguhêrandin** | (k.jn.dar. mê) 1. Oandin. Hinartin. 2. Pêk gihûrîn. |
| **Veguhêrîn** | (k.jn.dar.mê) 1. Oandin. Hinartin.2.Pêk guhartin. |
| **Vehandin** | (k.jn.dar.mê) Têkalandin. Li hev badan. Darijtin. : Kezî vehandin, bendik vehand, hozan vehandin. (K). Bdn:ez di vehînim em di vehînîn, tu di vehînî hûn di vehînin, ew di vehîne[…it] ewan di vehînin.. Pr : Dê[bi]+ bdn. Bdb : di vehand, di vehandin. Db,dûr: vehandibû,vehandibûn. (F) : bi vehîne, bi vehînin |
| **Vehejandin** | (k.jn.dar.mê) Zirziqandin. Hejandin.Leqandin. Ji xew rakirin bi hejandinê. (K) bn: Hejandin. |
| **Veherifte** | (rd.dar.çewa) Mirovê bê serûber. : Eve te çi kirîye, tu ho yê veherifte?. |
| **Vehewandin** | (k.jn.dar.mê) Li cem xwe hiştin xwarin vexwarin û xew jêra dabîn kirin. Demekê li nik xwe hêlan. (K) bn: Hewndin. |
| **Vehêl** | (hn,hk.dar.çewa) 1. Damayî. Gîro. 2.Navê keç û xortane. |
| **Vehêlan** | (k.jn.dar.mê) Piçek, hindik li paş xwe hêlan. : Em bi rê di çûn, me hevalên xwe piçek vehêlan. (K) bn: Hêlan. |
| **Vehisîn** | (k.jn.dar.mê) Dîwar vehisîn , cihên pêdvî kurê yan çîmentoyê lê di din û bi amêrekî hilî di kin. Bivir, das, kêrik û htd vehisîn ang; bi beravî hisîn û dubare hisîn û xweşkirin.(K) bn: Hisîn. |
| **Vejandin** | (k.jn.dar.mê) Dubare çêkirin. Nûkirineve.Saxkirin. Anîn jiyanê. :Bernameya avakirinê vejand. |
| **Vejen** | (n.dar.dz) 1. Vedan. Karvedan. Dengvedan. 2. Navekê kurdî du nivşî ye. |
| **Vejenîn** | (k.jn.dar.mê) Bersivdana karî. : Zarokî ber li dîwarî da, vejenî û bi serê wî kevt[keft]. (K) bn : Jenîn. |
| **Vejîn** | (k.jn.dar.mê) 1.Dubare jîyan. Xwe di ber kawdanên nexweş girtin. Berdewamîya jiyanê. 2. Navê xort û keçane. |
| **Vekêş** | (n.dar.mê) 1.Givişk.2. Kêşan. :Ji xewan vekêkş dane xwe. |
| **Vekêşan** | (k.jn.dar.mê) Dema mirov tiştekî jibo alîyê xo rabi kêşe. |
| **Vekêşîn** | (k.jn.dar.mê) bn :Vekêşan. |
| **Vekirin** | (k.jn.dar.mê) Tiştê girtî mirov ve di ke. Derî veke, dilê xwe veke. Çavên xwe vekirin. (K) bn: Kirin. |
| **Vekirî** | (rd.dar.çewa) Derê hatî vekirin. Vala. :Derê malê herdem jibo mêvanan yê vekirîye. |
| **Vekolan** | (k.jn.dar.mê) 1. Erdekî bi kolî û çalan tê ve bi kî. 2 .Li dû çûn. : Ber derê mala xwe vekola. (K) bn : Kolan. |
| **Vekolîn** | (k.jn.dar.mê) Lêkolîn. Li dwîvçûn. :Vekolîn liser mijarê hat kirin. |
| **Vekujtin** | (k.jn.dar.mê) Serbirîn. : Bizin, pez, ga, mirîşk û htd vekujt, ang; serê wî/wê jê vekir.(K) bn: Kujtin. |
| **Velîztin** | (k.jn.dar.mê) Guhertina mijarê û dirokirin. Xapandin. Serdabirin. Badan. (K) bn:Lîztin. |
| **Vemalîn** | (k.jn.dar.mê) 1. Pakijkirin. Malîn. 2. Perixandin. :Pişta wî velamî. Xuha enya xo vemalî. (K) bn: Malîn. |

| | |
|---|---|
| **Veman** | (k.jn.dar.mê) 1. Gîrobûn. Paşdaman. 2. Navekê kurdî du alîye. (K) bn: Man. |
| **Vemirandin** | (k.jn.dar.mê) Çikkirin. Bêdengkirin. Temirandina agirî, radyo, tv û htd. :Agir vemirand. :Cigarê vemirîne. (K) bn : Mirandin. |
| **Vemirîn** | (k.jn.dar.mê) Bêdengbûn. Kizbûn. Temirîn. :Agir vemirî. |
| **Venan** | (k.jn.dar.mê) Danan. Çiklandin. Qîtkirin. : Kêlek vena, armancek vena. |
| **Veniştin** | (k.jn.dar.mê) Mirîşk liser hêkan, liser hêlînê melisî. |
| **Venwîsan** | (k.jn.dar.mê) Li ber danan. Xwe berhevkirina jibo êrişekê, yan girtina tiştekî. :Pişîkê xwe li ber mişkî venwîsaye. : (K) bn: Nwîsan. |
| **Veperixandin** | (k.jn.dar.mê) Vemalîn. Qayîlkirin. Vexurandin. (K) bn: Perixandin. |
| **Vepeşîn** | (k.jn.dar.mê) Hilingivtin. Peşîn.: Ker vepeşî û di ser serê xwe da çû.(K) bn: Peşîn. |
| **Veqetandin** | (k.jn.l.mê) Jê vekirin. Jê birîn. Bi cih hêlan. : Ez yê ji hevalan ve qetaym. |
| **Verestin** | (k.jn.dar.mê) Xwe ji girêdan, qeydkirinê, vekirin û bazdan. Xwe ji destan derêxistin. Havêtin. |
| **Vereşan** | (k.jn.dar.mê) Verişyan. Hilavêtin. |
| **Verêj** | (n.dar.mê) Bermayî. Puxte. :Verêja axiftinê. |
| **Verêlyan** | (k.jn.dar.mê) Bêserûberbûn. |
| **Verêlyayî** | (hk.dar.çewa) Bê serûber. Oepilî. Jiberêk çûyî. |
| **Verês** | (n.dar.mê) ***rêzman*** Çewanîya dirist xwandin û lêvkirina pît û peyvan. |
| **Verêsan** | (k.jn.dar.mê) ***rêzman*** Pît pît xandin ta bi karin peyevê bi lêv kin. Vehandin. |
| **Verişyan** | (k.jn.dar.mê) Dilrabûn. Rijyan. Hilandin. (K) bn: Rişyan. |
| **Vestirîn** | (k.jn.dar.mê) Hevîrkirin.ar vestirîn, kur vestirîn û htd. (K) bn: Stirîn. |
| **Veşargeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê xwe lê veşarinê. Hişargeh. |
| **Veşarin** | (k.jn.dar.mê) bn:Veşartin. |
| **Veşartgeh** | (hk.cih,n.dar.mê) bn:Veşargeh. |
| **Veşartin** | (k.jn.dar.mê) Li cihekî danan ko tu kes nebîne. (K) bdn: ez di veşêrim em di veşêrîn, tu di veşêrî hûn di veşêrin, ew di veşêre[…it] ewan di veşêrin.Pr.dê [bi] + bdn. Bdb: di veşart, di veşartin. Db,dûr: veşartbû,…bûn. .(F) bi veşêre, bi veşêrin |
| **Veşartî** | (hk.dar.çewa) Tiştê hatî veşartin. Berze. Veşarî. |
| **Veşartok** | (n.dar.mê) ***lîstik*** Kesê li yarîya çînganê xwe di veşêre.Lîstikvanê çînganê yê xwe veşarî. |
| **Veşartokanê** | (n.gdar.mê) ***lîstik*** Yarîya çînganê. |
| **Vetiringîn** | (k.jn.dar.mê) Tiringên jê hatin. Tirkirin. |
| **Vetirsandin** | (k.jn.dar.mê) Tirsandina demildest. Bizdandin. Tirsandin. (K) bn: Tirsandin. |
| **Vetirsîn** | (k.jn.dar.mê) Tirsîna ji nişkêve.(K) bn: Tirsan. |
| **Veweşîn** | (k.jn.dar.mê) Vepeşîn . Kevtin. |
| **Vexwandin** | (k.jn.dar.mê) Gazîkirin jibo şahîyekê, xwarinekê û htd. : Me dused mirov vexwandin jibo şahîya pismamê xwe.(K) bn: Xwandin. |
| **Vexwandî** | (n.dar.dz) Xandî. Mêvan. |

| | |
|---|---|
| **Vexwarin** | (k.jn.dar.mê) 1.Weke mirov avê yan madeyên şil di xwe[ vedixwe]. 2. Tiştên şile, mirov bi kare fir ke.mîna av û xoşavan.(K) bn: Xwarin. |
| **Vexwendin** | (k.jn.dar.mê) bn :Vexwandin. |
| **Vexurandin** | (k.jn.dar.mê) 1. Veperixandin. 2. Qayîlkirin. Hawîşkirin. (K) bn: Xurandin. |
| **Vezelîn** | (k.jn.dar.mê) Vepeşîn. Hilisîn. Tehisîn. |
| **Vezelyan** | (k.jn.dar.mê) Vezelîn. |
| **Vezirziqandin** | (k.jn.dar.mê) Livandin û leqandin. Zirziqandin. |
| **Vê** | (cihn.x.mê) ***rêzman*** Cihnavê mêye û nêzîke.Evê. : Vê; keçê, jinê, darê, bizinê carê, gavê, rojê û htd. :vê ne, ya dî. |
| **Vêca** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pêvegire ,bikar di hêt dema mirov gotina hemberê xwe bi çi ve negirit. Herweko mirovî pêşdem ew gotin bihîstîye û ne seyre.Evca.2. Jibo berdewamîdan bi axivtinê û agehdarkirinê. |
| **Vêcar** | (pêrb.alv.pêvegir.l) Evê carê. |
| **Vêdan** | (k.jn.x.mê) Kitkit rakirin.Liblib hilgirtin. :Vêdana sêvên weryayn, :Vêdana pareyê hûr. :Vêdana genimî. (K) bn: Dan. |
| **Vêga** | (pêrb.alv.gir) Vêca. Evca. |
| **Vêgavê** | (hk.dem) Noke. |
| **Vêkdan** | (k.jn.dar.mê) Komkirin. Lêkdan. Xirvekirin. |
| **Vêkevtin** | (k.jn. dar.mê) Peydakirin. Vedîtin. Cihê wê/wî zanîn . bi ser hilbûn.(K) bn: Kevtin. |
| **Vêkkevtin** | (k.jn.l.mê) Bi êk kevtin. Lêkdan. : Du tirombêl vêkkevtin. :Mirov vêkkevtin. (K) bn : Kevtin. |
| **Vêra** | (hn.çewa) Bi hevra. Pêkve. Pêra. di Gel. |
| **Vêrê** | (hk.cih) Vê dirê. Vê rê. : Eve ji kengî were tu li vêrê ?. |
| **Vêsan** | (k.jn.x.mê) Bêhinvedan. Palvedan. Xwe jibîrve kirin. |
| **Vêxistin** | (k.jn.dar.mê) Lêdan. Hilkirin. : Fanos vêxist. Çira vêxistin. (K)bn :Xistin. |
| **Vi** | (pêrb.x) bn :Bi. Vê |
| **Viç** | (hn.x.çew) ***deng*** Dengê tiştên hilî,wek av û kefê. |
| **Viçên** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengê viçviçê. |
| **Viçviç** | (n.dar.mê) Viçên. |
| **Vijên** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengê bayî, weke li tayên daran di dit. |
| **Vil** | (hk.x.çewa) Cihê nerim. Nerim. Pilox.: Gundorê vil. Peqîşka vil. |
| **Vilbûn** | (k.jn.l.mê) Nerimbûn. :Sîvoka serê wî ya vil bûy!.(K) bn : Bûn. |
| **Vilik** | (n.dar.mê) Peqîşkên vil ji egera karî li dest û pêyên mirovî peyda di bin. Peqîşk. |
| **Vilkirin** | (k.jn.l.mê) Nerimkirin. Qayîlkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Vir** 1 | (n.x.mê) Direw. Diro. |
| **Vir** 2 | (hk.cih) Li vêrê .Li vir. Eve çend salin ez li vir di mînim. BR× Wir. |
| **Vir** 3 | (n.x.mê) Avrîyeke mirov rûyê xwe badide, derbirîna bê minetîyê .Difinbilindî . |
| **Virdanan** | (k.jn.l.mê) Xwe badan û difinbilindkirin. (K) bn : Danan. |

| | |
|---|---|
| **Virçikî** | (hk.dar.çewa) Mirovê lewaz. |
| **Virde** | (hk.dem) 1. Li vir. Bo vêrê. 2. Ji noke û paş. :Ji îro û virde ez dê her roj herim xwendingehê. |
| **Virek** | (hk.dar.çewa) Direwîn. Direwker. |
| **Virên** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengê havêjtina tenan, mîna dar, ber, kevir û htd. |
| **Virik** | (n.dar.mê) Zikçûn. Hinavêşî. |
| **Virişkî** | (hk.da.çewa) Çepel. Lewçe. Dîn. |
| **Virker** | (hn.dar.çewa) Direwîn. |
| **Virkirin** | (k.jn.l.mê) Direwkirin. (K) bn : Kirin. |
| **Viro** | (hd,pesin,n.gaz. dar) Direwîn. Direwker. |
| **Virvirandin** | (k.jn.l.mê) Mirov tiştekî wesa bi havêje ko virên jê bê. |
| **Virîk** | (n.x.mê) xwarin Core zadeke danhêrk û kulind an di nav av û temate da di kelînin. Virîka bi kulind. |
| **Virvirok** | (n.dar.mê) 1.Amêreke ji bendikan û xirxalekê dirist kirîye zaro ba didin virên jê di hêt. 2. Perwaneyên kaxetî.3. Firokeya helîkopter. |
| **Vitên** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengeke jibo mirovê tirsonek di bêjin ko ji paşîyê di hêt. |
| **Viyan** | (k.jn.x.mê) Hezkirin. (K) bdn:min,me, te, hûn, wî, wê, wan, we, di vêt bdb: di viya. Db,dûr; viyabû, bû, (F): bi vê, bi vên.2. Navê keçane. |
| **Vizên** | (n.dar.mê) Dengê avê yan xwînê, dema ji kunek yan cihekê teng ra di peşit. |
| **Vî** | (cihn.tek) ***rêzman*** Cihnavekê, teke, nêre. Evî. :Vî peyayî çi bi serê min anî !. |
| **Vîdyo** | (n.cîhan) Amêreke, kasêtan di kin ber jibo nîşadan yan tomarkirina reng û dengan. |
| **Vîn** | (n.x.mê) Evîn. Vîyan. |
| **Vîndar** | (hk.dar.çewa) Evîndar. |
| **Vîr** | (hk.x.çewa) Mirovê çavên wî di xwar. Çavtirîwar. Xêl. Hewêl. |
| **Vîrbûn** | (k.jn.l.mê) Çavên mirovî vîr di bin. (K) bn: Bûn. |
| **Vîrkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov çavên xwe xwar di ke. Xêl di ke. (K) bn: Kirin. |
| **Vîros** | (n.x.cîhanî.mê) ***candar*** Candarekê hûrike, bi çav nahêt dîtin. Vayros. |
| **Vîtamîn** | (n.x.cîhan.mê) Madeyeke di nav xwarinanda ye, gelek corin, mîna a,b,c,d, û htd,leşî pêdvî pê heye. |
| **Vîze** | (n.cîhan.x.mê) Derbazname. |
| **Vîzên** | (n.x.mê) ***deng*** Dengê bayî. |
| **Vîzevîz** | (n.dar.mê) ***deng*** bn :Vîzên. |
| **Vîzevîzkirin** | (k.jn.gl.mê) Dengê vîzênê jê peydabûn. Bayê vîzevîzê di ke. |
| **Vîzvîzk** | (n.dar.mê) Hacîreşk. Kurîmeqesok. |
| **Volkan** | (n.biyan) Agirkan. Kanîya agirî. |
| **Volt** | (n.biyan) Yekeya hêza têhna karebê. |

# W

| | |
|---|---|
| **W** | (we) Pîta bîst û heştê ji abeya kurdî. |
| **Wa1** | (hd,pêrb) ***rêzman***. 1.Alaveke jibo hicmetîbûnê bikar dihêt.: Wa, |
| | ma te ez ne dîtîme tu wesa li min dinêrî?. 2.Alavê hodenge, Jibo bangkirinê bi kar di hêt. : Wa hevalino. Wa yadê, wa bira. |
| **Wa2** | (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo misogerkirin û hevberkirinê bi kar di hêt. Wesa. Ûsa. Weha. |
| **Wa 3** | (cihn) Wan. Wana. Ewan.:Mala wa. Gundê wa,ango mala wan, gundê wan. |
| **Wan 1** | (cihn) ***rêzman*** Cihnavê kesê sêyem yê pirînî. Ewan. :Ji wan re bêje îro me civîn heye. |
| **Wan 2** | (hk.cih,bajar,cugirnş Bajarekê kurdane li Kurdistana bakûr. |
| **Wana** | (cihn) ***rêzman*** Mala wana li perê gunde. Wan.:Tu çûy mala walana?. |
| **Wane** | (n.x.mê) Waneya ziman, waneya dîrokê, waneya dîn û htd. Fêrkirin. Nîşadan. |
| **Wanedan** | (k.jn.l.mê) Pêşkêşkirina waneyan .Fêrkirin.:Seyda waneyan di de xwendekaran. (K) bn: Dan. |
| **Wanî** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pêvegir,ango; Weha. Wesa. :Çend caran dê bêjim te wanî na be!. |
| **Waqên** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengê rûvî. |
| **Waqwaq** | (n.dar.mê) ***deng*** 1. Dengê waqêna rûvî.qaz û werdekan. 2. Qîjîyên zarokên zava. |
| **Waqwurman** | (k.jn.dar.mê) Hicmetîbûn. Seyrman. Hêbetîman. |
| **War** | (hn.cih,n.nêr) 1.Cih. Welat. Cihwar.2. Delîve. Alî.: ***Pend*** Warê direwînî reşe. ***Pend*** :Warê ji waran pîroztir hene. |
| **Wargeh** | (hn.cih) Cihwar. Cûnwar. |
| **Warhêl** | (hn,hk.dar.çewa) 1. Kesê ji warê xwe dûr di keve.2 .Navê keç û xortane. |
| **Warîn** | (hk,hn.n.dar.dz) 1. Mirovê evîndar û girêdayê ware xwe.1. Navê jin û mêrane. |
| **Warkor** | (hk.l. çewa) Bê mal. Bê welat. Bê cih.Korewar. |
| **Warocax** | (n.l.mê) Cûnwar. |
| **Warvan** | (hn,hk.n.dar.dz) 1.Xwedî welat, war.2. Navekê du zayende. |
| **Warvîn** | (hn,hk,.n.dar.dz) 1. Warperwer.2. Navekê nêr û mêye. |
| **Warxan** | (n.dar.mê) Texe. : Xanîyê me ji sê warxanan pêk di hêt. |
| **Warzan** | (hk,hn.n.dar.dz) 1. Carezayê warê xwe. 2 .Navê kiç û kurane. |
| **Wate** | (n.x.mê) Raman. Ango. :Wateya vê peyvê çiye?. |
| **Wawîk** | (n.x.mê) Dijûn. Xeber. |
| **Wax** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê dax, kovan ê. Ax. |
| **Way** | (pêrb) ***rêzman*** 1. Alavê keser û kovanê. : Way eve çi bi serê vî rebenî hat. 2. Alavê hicmetîbûnê. :Way ew çîyayê hanê çendê bilinde!. Wey. |
| **We 1** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê hicmetîbûnê. :We, eve çi axiftinin tu di bêjî!. |

| | |
|---|---|
| **We 2** | (cihn) ***rêzman*** Cihnavê kesê duyê, pirînî.Hewe. :Mala we. :Derdê dilê we. :We çi di vê?. |
| **We 3** | (pêrb) ***rêzman*** 1. Alavê hevberkirinê. Wesa. Weha.:We ne ke!. :We diyare tu ne ji vî bajarîyî?. 2. Alavê pejirandinê. Rast. Dirist. : Asiftina te gotî weye. |
| **Weha** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pêvegir. Hosa. Osa. Wesa.wanî. |
| **Wek** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê mînakî. Mîna. Nimûne.:Wek te kerem kirî. :Wek wan diriste!. |
| **Weke** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pêvegir. Weko. Herweko.:Weke di bêjin. :Weke mirov bi xwaze. |
| **Wekêk** | (hk.l.çewa) Peyveke mirov bo hevberkirina tiştan, du yan pitir, mirov, candar. :Ez û te ne wek êkîn.:Ev du kotire wekêkin. :Cêmik wekêkin. :Xanîyê hewe û wan wekêkin. Wekhev. |
| **Wekêkî** | (n.l.mê) Wekhevî |
| **Wekhev** | (hnkl.çewa) Wek yek. Wekêk. |
| **Wekhevî** | (n.l.mê) Mirov hemû wek yek bin. Bê cudayî. Tebayî. |
| **Wekî** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pêvegir. Mîna. Wek. |
| **Weko** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pêvegir. Wek. Mîna. |
| **Wekok** | (n.dar.nêr) Mînak. Wêne. Jêgir. |
| **Welat** | (n.x.nêr) Tixûbê cihekê diyarkirîye , ku deshelata xwe heye, ziman û çanda wan heye, rûnişvanên wê xwe bi rêve di bin. War.:Welatê me Kurdistane. |
| **Welatî** | (n.dar.dz) 1. Kesê nasnameya wî ya welatekî be, yê lê di jît. :Welatîyên Kurdistanê.2. Rûniştvan. |
| **Welatname** | (n.l.mê) Giroveyên welatîyan. Paseport. Nasnameya welatî |
| **Welatparêz** | (hk.l.çewa) Mirovê berevanîyê ji welatê xwe di ke.Nîştimanperwer. |
| **Welê** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê girêdanaê. Lê. Jiber hindê. Jiber vê yekê. |
| **Wend** | (hk.x.çewa) Mêrçak. Çavnetirs. Merd. |
| **Weqweq** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengê qaz, werdek, rûvî td. Waqwaq. |
| **Weqî** | (n.x.mê) Yekeyeka pîvanê ye. : Weqîyeka şekirê, tovçayê û htd. |
| **Wer** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pêvegir.Wesa. Hosa. Wetov. |
| **Werandin** | (k.jn.mê) Jê êxistin bi hejandinê. : Ba belgên daran di werîne. Azadî sêv werandin. (K) bdn: ez di werînin em di werînîn, tu di werînî hûn di werînin, ew di werîne[…it] ewan di werînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di werand, di werandin. Db,dûr: werandibû,werandibûn. (F) : bi werîne, bi werînin. |
| **Weranîn** | (k.jn.x.mê) Werandin. |
| **Werar** | (n.x.mê) Pêşdaçûn. Pêşkevtin. Geşbûn. |
| **Werarkirin** | (k.jn.l.mê) Pêşdaçûn. :Rewşa aborî li welatî roj bi roj werarê di ke. |
| **Werbadan** | (k.jn.dar.mê) Li hev badan. Lêkzivrandin. Têkalandin. (K) bn: Badan. |
| **Werçerxan** | (jn.l.mê) Wergeran. |
| **Werdan** | (k.jn.dar.mê) 1.Tafîrkirin. Pakijkirin. Cûştin. 2.Binavkirin. Niqokirin. |

| | |
|---|---|
| **Werdek** | (n.x.dz) ***tewal*** Balindeyek, hêkker,malî yan kûvîye, di avê da û li dêmî di jît. |
| **Werez** | (n.dar.dz) Mirovê rez, bîstan yan cinîka êkî bi kirê di girit hember hindek ji hatîyê mitayî, yan pareyî. |
| **Werger** | (pîşn.dar.dz) Wergêr. |
| **Wergeran** | (k.jn.dar.mê) Qulipîn. Hilingivîn. Guherîn. (K) bn: Geran. |
| **Wergerandin** | (k.jn.dar.mê) 1. Deqên zimanekî bo yê din veguhaztin. 2.Serabinkirin. (K) bn:Gerandin. |
| **Wergêr** | (pîşn.dar.dz) Kesê zimanekî di guhêrit yê dî. Mirovê karê wergênê di ket. |
| **Wergêran** | (k.jn.dar.mê) Zimanek wer di gêre yê din. : Ev çîroke ji elmanî wergêraye ser zimanê kurdî. (K) bn: Gêran. |
| **Wergirtin** | (k.jn.dar.mê) Bi dest xwe ve anîn. Peydakirin. :Hêjta min mehyana xwe ne wergirte. :Vê diyarîyê ji min wergire!. (K) bn: Girtin. |
| **Werim** | (n.x.mê) Cihê êvitî. |
| **Werimîn** | (k.jn.x.mê) Êvitîn. Perçivîn.(K) bdn: ez di werimim em diwerimîn, tu di werimî hûn di werimin, ew di werime[...it]ewan di werimin. Pr: dê[bi]+bdn. Bdb: ez di werimîm em di werimîn, tu di werimî hûn di werimîn, ew di werimî ewan di werimîn. Db,dûr: ez werimîbûm, em werimîbûyn, tu werimîbûy hûn werimîbûn, ew werimîbû ewan werimîbûn. (F): bi werime, bi werimin. |
| **Werimtin** | (k.jn.x.mê) Werimîn. |
| **Werîn** | (k.jn.x.mê) [hatin] Bizivîn ji cihek dûr bo yê nêz. (K) bdn: ez di werim em di werin, tu di werî hûn di werin, ew di were ewan di werin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb. Db,dûr : bn hatin. (F) : were, werin. |
| **Werîs** | (n.x.nêr) Bendekê stûr û dirêje, jibo girêdan û peytkirina baran mifa jê di hêt wergirtin,ji hirî û mûyên kewalan çê di kin. Kinif. ***Pend*** :Werîsê direwan yê kurte. |
| **Werpêçan** | (k.jn.dar.mê) Çend caran lêkpêçan. Têkpêçan. Balolikkirin. (K) bn: Pêçan. |
| **Werqas** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo destnîşankirina çewayî û çendayîyê bi kar di hêt. Hinde. Wesa. |
| **Werwere** | (n.dar.mê) Debance. Demance. |
| **Weryan** | (k.jn.x.mê) Kevtin. Jê kevtin. : Por weryan. Fêqî di werit. |
| **Werz** | (n.x.nêr) 1. Demsal. Dansal. :Çar werzên salê; bihar, havîn, payîz û zivistan.2. Perçe erdê çandinê. Bîstan. :Werzekê gundoran, zebeşan. |
| **Werzi** | (n.x.mê) Yarî. Lîztin. |
| **Werzi kirin** | (k.jn.l.mê) Yarîkirin. Lîztin. :Qutabî li qada xandingehê werzişê di ken.(K) bn: Kirin. |
| **Werzi van** | (n.dar.dz) Lîstikvan. Yarîvan. Yarîzan. :Azad werzişvanekê hêjaye. |
| **Wesa** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pêvegir. Weha. :Tu çima wesa di bêjî ?. :Çewa tu hatî, wesa jî here!. |
| **Westan** | (k.jn.x.mê) Manîbûn. :Ez îro geklekê wstaym. (K) ; bdn: ez di westim em di westîn, tu di westî hûn di westin, ew di seste[…it] ewan di westin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb: di westam[westiyam], westan[westayn], |

| | |
|---|---|
| | westay[westiyay] ,westan[westiyan], westa[westiya]. Db, dûr: westabûm[westiyabûm],….bûy, bûyn, Bûn. (F) : bi weste, bi westin. |
| **Westandin** | (k.jn.mê) Mandîkirin. : Ez xwe gelek di westînim, jibo karê xwe zû bi dawî bi hînim.(K): bdn: ez di westînim em di westînîn, tu di westînî hûn di westînin, ew di westîne[…it] ewan di westînin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb : (ez di hatim westandin.ango; ez westandim) di westand, di westandin. Db,dûr:westandibû, westandibûn. (F): bi westîne, bi westînin. |
| **Westayî** | 1 (rd.dar.çewa) Mandî. :Ew mirovek westayîye. |
| **Westayî** | (hk.dar.çewa) Rawestayî. Li ser pêyan rawestan. |
| **Westihan** | (k.jn.mê) Westan. |
| **Westihayî** | (hk.dar.çewa) Westayî. |
| **Westiyan** | (k.jn.mê) Westan. |
| **Westiyayî** | (hk.dar.çeqwa) Westayî. |
| **Westîk** | (n.dar.mê) Rawestana zarokan li ser pêyan bo cara êkê. |
| **Westîkkirin** | (k.jn.l.mê) Zarok pêkolê di ke liser pêyan raweste. :Keça wan bi pêyan na çit, lê westîkê di ket. (K) bn: Kirin. |
| **Weş** | (rd.x.çewa) Xweş. Xoş. |
| **Weşan** | (n.x.mê) Belavkirin. Ragehandin.Gehandin. : Guhdar di karin her roj we)ana radyoya dengê Kurdistanê bi bihîzin. |
| **Weşandin** | (k.jn.x.mê) Derêxistin. Derkirin. Çapkirin. :Rojnamek weşand. Radyo, TV weşandin. (K) bdn :ez di weşînim em di weşînîn, tu di weşînî hûn di weşînin, ew di weşîne[…it] ewan di weşînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di weşand, di weşandin. Db,dûr: weşandibû,weşandibûn. (F) :bi weşîne, bi weşînin. |
| **Weşanxane** | (hk.cih,n.l.mê) Cihê weşandinê. Çapxane. |
| **Weşî** | (n.dar.mê) Xwe)î. Tenayî. |
| **Wexer** | (n.x.mê) Çûn. Dûrkevtin. Koç. |
| **Wexerkirin** | (k.jn.l.mê) Koçkirin. Barkirin. Malavayîkirin. Mirin. (K) bn: Kirin. |
| **Wext** | (n.x.nêr) Dem. Çax. |
| **Wey** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo hicmetîbûnê bi kar dihêt. :Wey babo eve çi dehbeye!. |
| **Weye** | (pêrb) ***rêzman*** Alava misogerkirin û piştraskirinê ye. Wesaye. : Axivtina te gotî sedased weye. |
| **Wezaret** | (n.x.mê) Calyarî. Cihê karê wezîrî. |
| **Wezîr** | (n.x.dz) Calyar. |
| **Wê** | (cihn.x.mê) ***rêzman*** Cihnavê kesê sêyê yê mê. Ewê. : Eve mala Nesrînê ye, eve mala wê ye.Çaxê borî. : Wê rojê tu li xandingehê nebûy. Wê gavê min tu nenasî li min bi bore. |
| **Wêda** | (hn.cih.dar) bi Wî alî da. Ber bi cihek dûr.Wêve. |
| **Wêdatir** | (hn.cin.l) Wêvetir. |
| **Wêderê** | (hn.cih. l) Cihê dûr. Wêrê.Br× Vêderê. |
| **Wêje** | (n.x.mê) Edeb û honer. |
| **Wêne** | (n.x.nêr) Mînak. Nîgar. Risim. :Weneyê xo bi dîwarî ve hilawîst. |

| | |
|---|---|
| **Wêneçîrok** | (n.l.mê) Çîrokên bi wêneyan di hên şirovekirin jibo mirov çak tê bi gehe, nemaze zarok. |
| **Wênegir** | (pîşn.dar.dn) Kesê karê wî girtina wêneyan. Kamêravan. |
| **Wênegirî 1** | (karn.l.mê) Karê girtina wêneyan. |
| **Wênegirî** | (hk.cih,n.dar.mê) Wêneşûyî. :Wêgirîya rojhilat. |
| **Wênegirtin** | (k.jn.l.mê) Mirov wêneyan bi girit yan bi kêşit. (K) bn: Giritin. |
| **Wênekêş** | (pîşn.dar.dn) Wênegir. |
| **Wênekêşan** | (k.jn.l.mê) Çêkirina mînakan bi dest yan bi amêran girtin. |
| **Wênekirin** | (k.jn.l.mê) Çêkirina mînakan. Kêşana wêneyan. (K) bn: Kirin. |
| **Wêneşûyî** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê şûştina wêneyan. |
| **Wênevan** | (karn.dar.dz) Kesê wêneyan di girit. Xwedîyê wêneşûyê. |
| **Wêran1** | (hk.x.çewa) Kavil. Heriftî. : Gundek wêran. Malek wêran;ang kavil. |
| **Wêran2** | (k.jn.x.mê) Mirov bê tirs karê xwe bi ket. :Ez ne wêrim bi ava sar serê xwe bi şûm. (K) :bdn: ez di wêrim em di wêrîn, tu di wêrî hûn di wêrin, ew di wêre[…it] ewan di wêrin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb :di wêram, di wêran[wêrayn], di wêray, di wêran, wêra, wêran. Db,dûr : wêrabûm,…bûy..bû, bûn. (F) : bi wêre, bi wêrin. |
| **Wêranbûn** | (k.jn.l.mê) Kavilbûn. Heriftin. |
| **Wêranker** | (karn.dar.dn) Kavilker. Xirabkar. |
| **Wêrankirin** | (k.jn.l.mê) Kavinkirin. Xaporkirin. Herifandin. (K) bn :Kirin. |
| **Wêrek** | (hk.dar.çewa) Çavnetirs. Bihinav. Biwêr. :Jineka wêrek. :Zelamekê wêrek. |
| **Wêrê** | (hk.cih) Çihê dûr.li wê derê. Br× Vêrê. |
| **Wêrîn** | (k.jn.x.mê) bn :Wêran, wêryan. |
| **Wêryan** | (k.jn.x.mê) Wêran. Netirsan. |
| **Wic** | (n.x.mê) Sûd. Mifa. Kêrhatin. : Karekî bi ke wic têda hebit!. |
| **Wicdar** | (hk.dar.çewa) Mirovê wic jê çê di bit. Karê bi wic.:Xortê wicdar, mifayî di gehîne mal û welatê xwe. |
| **Wiha** | (pêrb) ***rêzman*** Weha. Wesa. |
| **Wijdan** | ( n.x.mê) Mirovê xwedî wijdan, mirovê bi wijdan ,ang; mirovê dilsoj di kar û kiryaranda.. Bê wijdan ; dilreş. dilreq. |
| **Wilo** | (pêrb) ***rêzman*** Hesa. Wetov. Çima tu wilo di bêjî ?. |
| **Winda** | (hk.x.çewa) Berze. Hinda. :Pareyê winda. |
| **Windabûn** | (k.jn.l.mê) Berzebûn. Hindabûn. : Eve heyameke qelemê min winda bûye.(K) bn: Bûn. |
| **Windakirin** | (k.jn.l.mê) Hindakirin. Berzekirin. :Min telefona xwe winda kirî ye.(K) bn: Kirin. |
| **Wir** | (hn.cih.dûr) Li wir. Li wêrê. Wêra han. Br× Vir. |
| **Wirde** | (n.x.nêr) Pareyê hûr.Hûrde. |
| **Wirya** | (hk.x.çewa) 1. Hişyar.2. Navê mêrane. |
| **Wisa** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê pêvegir. Wesa. Weha. |
| **Wişandin** | (k.f,nx.mê) Hajotina dewaran. Hespê xwe di wişînin. :Wişe kero.Here. (K) bdn: ez di wişînim em di wişînîn, tu di wişînî hûn di wişînin, ew di |

| | |
|---|---|
| | wişîne[…it] ewan di wişînin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb : di wişand, di wişandin. Db,dûr : wişandibû, wişandibûn. (F) : bi wişîne, bi wişînin. Br× Coş. |
| **Wî 1** | (cihn.x, nêr) ***rêzman*** Cihnave, nêre,kesê sêyê tek. Ewî. : Elindî karê xwe kir, ang; wî karê xwe kir. |
| **Wî 2** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo bûyerên seyr bi kar di hînin, xasme jin. : Wî dayê eve çîye?. |
| **Wîç** | (n.x.mê) ***deng*** Dengê çûçikan. |
| **Wîçên** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengê wîçê ji çûçikan di hêt. |
| **Wîçkirin** | (k.jn.l.mê) Çûçik wîç di ke. Xwandina çûçikan (K) bn: Kirin. |
| **Wîçwîç** | (n.dar,l.mê) Wîç. |
| **Wîçwîçkirin** | (k.jn.gl.mê) Xwandin. Wîçkirin. : Çûçika liser darê wîçwîçê di ket. |
| **Wîqanê** | (n.dar.mê) ***lîstin*** Yarîyeke zarok xwe di veşêrin û bi lez di hên ber çavên hevdu bi gotina 'wîq'!. |
| **Wîqanêkirin** | (k.j.n.l.mê) Mirov lîztika wîqanê diken.(K) bn: Kirin. |
| **Wîr** | (hk.x.çewa) Vîr. |
| **Wîsên** | (n.dar.mê) deng Dengê têjikên çûçikan. |
| **Wîskirin** | (k.jn.l.mê) Têjikên balindeyan dengê wîsênê di kin. (K) bn: Kirin. |
| **Wîswîskirin** | (k.jn.gl.mê) Wîskirin. |
| **Wîştandin** | (k.jn.x.mê) Rawestandina kewalan.:Wîşte bizinê!.ango raweste!.. Br x Çitandin. |
| **Wîtên** | (n.dar.mê) deng Dengê xwandina hin balindeyane. |
| **Wîtik** | (n.dar.nê) Balindeyê dengê wîtênê jê di hêt. Pend :Wîtikê wîtanî, te mala min xira kir, ya xwe jî liser danî. Ang; mirovekî dengê wîtêna balindeyî bihîstî, ji wîve bihar hat, lê seqema zivistanê balinde kujt û mirov jî xapand, evca kabira li hindav kelexê teyrikê mirê ev gotin got. |
| **Wuşe** | (n.x.mê) Peyv. :Wuşeya welat. |
| **Wuze** | (n.x.mê) Têhin. |
| **Wû** | (hk.x.çewa) deng Dengê lûrîna guran. Lûrîna guran. |
| **Wûtin** | (k.jn.x.mê) Gotin. Peyvîn. |

# X

| | |
|---|---|
| **X** | (xe) Pîta bîst ii nehê ya abeya kurdî. |
| **Xabûr** | (hk.cih,.cugnr.x.nê) Navê çemekî, û deverekê ye li Kurdistan Iraqê. |
| **Xaç** | (n.x.mê) Du xîçên li ser hevdu derbazbûyîne,. :Nîşana dînê felane. |
| **Xaçasor** | (n.I.mê) Rêkxistîyeka mirovantî, cîhanî ye. |
| **Xaçepirs** | (n.l.mê) Çend pisyarekin di malikên çakujî da bi awayekê stûnî u asoyî hevdu di birin, her malikek bi pîtekê di hêt pir Kirin tanî peyvek peyda di bit, çi stûnî yan asoyî. |
| **Xaçerê** | (n.I.mê) Rêyên di serêk ra derbaz di bin mîna xaçê. Duryan. |
| **Xaçerêz** | (n.l.mê) Xişteyeke ji çendîn valayîyên şêwe çarkujî pêk hatîye, hevdu bi stûnî û asoyî di birin,her çarkujîyekî mirov pîtekê têda di nivîse, tanî bi awayê asoyî ii herweha stiinî peyvek jê peyda di be. Xaçepirs. |
| **Xaçkirin** | (k.jn.l.mê) Kêşan xaçê. Xaç pêvekirin. (**K**) bn: Kirin. |
| **Xaçperês** | (hk.I.çewa) :Mirovê bawerî bi dînê mesîh heye. Fele. |
| **Xaçprêsî** | (n.I.mê) Bawerî bi ola felan. |
| **Xak** | (n.x.mê) 1. Ax. Erd. Welat. 2. Cilên kurdî yên mêran. |
| **Xakenas** | (n.I.mê) Mera kolanê. Merbêl. :Bi xakenasê rezan di kolin. |
| **Xakî** | (hk.dar.çewa) Rengê axê, rengê xak. :Cilikêt serbazan rengê xakîne. |
| **Xal 1** | (n.x.nêr) Birayê dayka mirovî. |
| **Xal 2** | (n.x.mê) Çipik. Nîşan. Pinî. :Xaleka liser rûyê wî. |
| **Xalbêhnok** | (n.l.mê) Çevengeka nemazeye di risteyanda bi kar di hêt, jibo ravekirineê. |
| **Xalet** | (n.x.mê) Xuşka dayka mirovî. |
| **Xaltî** | (n.x.mê) bn:Xalet. |
| **Xalxalk** | (n.dar.mê) **can** Hedamekê nav leşî ye, rengê wî sore.SipI. |
| **Xalxalok** | (n.I.mê) **candar** Kêzikeka Li ser şîlava gul û belgên daran di jît, gelek cor û reng hene ji wan; reng sor û xalên reş. |
| **Xam** | (hk.x.çewa) Xav. |
| **Xame** | (n.x.nêr) Qelem. Pênivîs. Pênûs.:Xameyê rengav. :Xameyê hişk. Xameyê rengîn. |
| **Xamtîr** | (hn.cih,cugm.x) Çîyeke li Kurdistanê devera Zaxo. |
| **Xan 1** | (n.x.mê) Xanî. Gova dewaran. |
| **Xan 2** | (n.x.dz) 1.Jibo rêzgirtinê digel navan bikar di hînin Hêja. Mîr.: Şirîn xan, Avdel xan û htd.2. Navê qehremanê dastana Dimdime.Xan ê lepzêrîn. |
| **Xan 3** | (n.x.mê) 1. Malik. 2. Pêkahatîyên şaneyên leşê candaran. |
| **Xançî** | (karn.dar.dz) Xwedîyê xana dewaran. |
| **Xandevan** | (n.dar.dz) Mirovê xandin û nivêsînê di zanit. Xwendevan. |
| **Xandin** | (k.jn.x.mê) Nivîsana liser kaxez û cihên dî ko mirovê xwendevan di kare bi xwîne. Waneyan di xwîne. Kitêban di xwînim. (**K**) bdn: ez di xwînim em di xwînîn, tu di xwînî hûn di xwînin, ew di xwîne[. . .it] ewan di xwînin. Pr : |

| | |
|---|---|
| | dê[bi] + bdn. Bdb : di xand, di xandin. Db,dû, xandibû, .. bûn. (F) bi xwîne, bi xwînin. |
| **Xandingeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê wane xwendinê. Dibistan. Qutabxane. :Xandingeha birayetî. :Qutabî çûn xandingehê. :Xandingeha kiçan. Xandingeha têkel. Xandingeha seretayî, navincî, amadeyî. |
| **Xandî** | (n.x.dn) Mirovê hatî daxazkirin jibo pişkdarîyê di şahîyê da bi ket. |
| **Xanedan** | (hk.dar.çewa) Mala ava û herdem ji mêvanan ra der vekirî. :MaIeka xanedan. |
| **Xanedanî** | (n.dar.mê) Rêzgirtina mêvanan. Mêvandarî. |
| **Xanenişîn** | (hk.l.çewa) Mirovê ji karî westayî ji egera bi dawî hatina salên karî yan nexweşîyan. |
| **Xanenişînbûn** | (k.jn.gl.mê) Dema mirov di gehe qonaxa xanenişînîyê, êdî ji karî di westit. :Paş çendîn salên karî seyda xanenişîn bû. (**K**) bn :Bûn. |
| **Xanenişînkirin** | (k.jn.gl.mê) Dema deshelat yan dezgeha karder mirovî xanenişîn di ke. : Rêveberîya çandinê çar fermaberên xwe xanenişîn kirin. (**K**) bn: Kirin. |
| **Xaneqîn** | (hk,cih,cugrn) Bajêreke li Kurdistana Iraqê. |
| **Xanê** | (hd,gazn.dar.mê)1. Naznav û bangkirina pîrekane.2. Navê pîrekane. |
| **Xanik** | (n.dar.nêr) Mêzeka girovire, sê pêye, yan çarkujî û çarpê, ji gêçê yan depî hatîye çêkirin, nanî liser di pêjin. |
| **Xanim** | (n.x.mê) 1. Jibo rêzgirtin di bêjin jinan. Hêja. Bi rûmet.2. Navê pîrekane. |
| **Xanî** | (n.x.nê) 1 . Mal. Avahî. **Pend** :Xanî bê karîte ava na be. **Pend** :Xanîyan stûn, karî qon. **Pend** : Xanîyan stûn, mêranîyê qon. 2. Paşnavê helbesvanê mezinê kurd Ahmedê Xanî. |
| **Xanîk** | (n.dar.nêr) 1. Xanîyê biçûk ê zarokan. 2. Naznavê xanî. |
| **Xano** | (hd,gazn.dar.nêr) Naznav û gazîkirina mêrê navê wî xan. |
| **Xanûman** | (n.g.l.pir) Navê keç û korekî ye di stiran û çîrokên kurdî da. : Xan û Man cotin. |
| **Xanxanik** | (n.I.mê) Xişte. |
| **Xanzad** | (n.I.mê) 1 . Ji malbatên xanan, mîran. 2. **dîrok** Mîra mîrnişîna soran. 3 . Navê jinan. |
| **Xap** | (n.x.mê) Find. Direw. Bêbextî. Tepik. |
| **Xapandin** | (k.jn.dar.mê) Di serda birin. Xirandin. Fêlkirin. Binîkolan. (**K**) bdn : ez di xapînim em di xapînîn, tu di xapînî hûn di xapînin, ew di xapîne[. . .it] ewan di xapînin. Pr : dê[bi] + bdn. Bdb : di xapand, di xapandin. Db,dûr : xapandibûm,...bûy, bûyn.. bû,..bûn.(**F**) : bi xapîne, bi xapînin. |
| | |
| **Xapartin** | (k.jn.x.mê) Xepirandin. Xeparekirin. Rezî bi xapirîne. Wî bîstanê xwe di xapirand. |
| **Xapîn** | (k.jn.x.mê) Di serda çûn. Hatin xapandin. |
| **Xapînok** | (karn.dar.dz) Mirovê xelkî di xapîne. Sextekar. |
| **Xar 1** | (hk.x.çewa) Nerast. Nedirist.Keç. **Pend** :Teyrê nêçîrê dimê wî xare. |

| | |
|---|---|
| **Xar 2** | (hk.cih) Binî. Jêr. li Xar. Li Binî. :Sivore ji darê hat xar. Ji kerê rikan nahêt xar. |
| **Xarbûn** | (k.jn.l.mê) Weke tişt xar di be. **Pend** :Heta xar nebit, rast nabit.ang; serbor dîtin pêdvîye. (**K**) bn : bûn. |
| **Xardan** | (k.jn.I.mê) Xarkirin. Bazdan. Ew ji mal ta xwendingehê bi xardan çû.(**K**) bn: Dan. |
| **Xarin** | (k.jn.x.mê) Dema mirov zadî di xwe. Zad. (**K**) bdn: ez di xom, em di xoyn, tu di xoy hun di xon, ew di xot ewan di xon.Pr: dê[bi] + bdn. Bdb: di xar, di xarn. Db,dûr. Xarbû, ...bûn. (**F**) : bi xo, bi xon. Xwarin. |
| **Xaringeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê mirov xarinê bi pare di kirit di xot. Cihê lênana xarinan. Xurekxane. |
| **Xarîfk** | (n.dar.mê) Perdax. Kop. |
| **Xarkirin** | (kj.n.I.mê) Mirov tiştekî, hesinekî darekî û htd xar bike. Çemandin. Tewandin.(**K**) bn: Kirin. |
| **Xarkirin** | (k.jn.I.mê) Bi lez çûn. Bazdan. :Zarok di kin xar. (K) bn: Kirin. |
| **Xarza** | (n.dar.dz) Kur yan keça xwehê. Xuşkza. :Kur yan kiça xwîşkê. |
| **Xas 1** | (hk.x.çewa) 1.Mirovê pêrîs. Bê bêlav. :Hejarê xas. |
| **Xas 2** | (hk.x.çewa) Çak. :Mirovekê xase û çi guneh nînin. |
| **Xasbûn** | (k.jn.l.mê) Pê rwîs di bin . bê pêlav di bin. Pêlav ji pêyan bû.(**K**) bn: Bûn. |
| **Xasî** | (n.x.mê) Bê pêlavî. Pêyên rwîs. |
| **Xaskirin** | (k.jn.I.mê) Pêlav ji pêyan kirin. :Xwe xas ke û here di avê da.(**K**) bn: Kirin. |
| **Xasme** | (hk.x.çewa) Taybet. Nemaze. :Pêdvîye hemû kes bi nivin, xasme zaro. |
| **Xaş** | (rd.x.çewa) Xweş. |
| **Xaşî** | (n.dar.mê) Xweşî. Tenahî. |
| **Xatirxaztin** | , xatirxwaztin (k.jn.I.mê) Malavayîkirin. (**K**) bn: Xwaztin. |
| **Xatînok** | ( n.dar.mê) Fêqî(tirî)yê hişikkirî. Kişmiş. |
| **Xatûn** | (n.x.mê) Şajin. Xanim. Hêja. Sitî. :Xatûnê peyvek xand. :Xatûna sertextî. |
| **Xav** | (hk.x.çewa) 1. Zadê ne kelandî. : goştê, hêka xav. :Zikê min di êşe, min zadê xav xwarîye. 2. Mirovê sist. |
| **Xavbûn** | (k.jn.l.mê) Sistbûn.:Mirov ji birsan da xav di bît. (**K**) bn: Bûn. |
| **Xavkirin** | (k.jn.I.mê) Sistkirin. Bêhinvedan. :Karê xwe bi ke û xwe xav neke!.(**K**) bn: Kirin. |
| **Xavlû** | (n.x.mê) Xawêlî. |
| **Xawêlî** | (n.x.mê) Qerîfk. Destmala zuhakirina leşî. |
| **Xazgînî** | (n.dar.pir) Bireka mirovan diçin mala bavê keçê jibo kurekî di xazin..Xaztina keçan. |
| **Xazîn** | ,xwazîn(k.jn.x.mê) Daxazkirin. (**K**) bdn: ez di xazim em di xazîn, tu di xazî, hûn di xazin, ew di xaze[. . .it] ewan di xazin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di xazt[xast] di xaztin. Db,dûr : xaztibû, ....bûn. (**F**) : bi xaze, bixazin. |
| **Xaztin** | (k.jn.x.mê) Xazîn. Xwestin. |
| **Xazok** | (hk.dar.çewa) Mirovê paran û tiştî di xazit.Çeqrût. |

| | |
|---|---|
| **Xebat** | (n.x.mê) Xizmeta dozeka rewa. Kar. Bizav. Têkoşîn. :Me sond xwarîye em dstan ji xebatê ber neden. |
| **Xebatgeh** | (hk.cih.n.dar.mê) Cihê karî. Qada xebatê. |
| **Xebatkar** | (karn.l.dz) Mirovê kar û xebatê di ke. :Pêşmergeh xebatkarin. |
| **Xebatker** | (karn.dar.dz) Xebatkar. |
| **Xebatkirin** | (k.jn.I.mê) Têkoşîn. Bizavkirin. Xebitîn. :Pale, cotyar, qutabî xebatê di ken jibo serferazîya gel û welat.(**K**) bn : Kirin. |
| **Xeber** | (n.x.mê) Dijûn. |
| **Xebergotin** | (k.jn.I.mê) Dijûndan. (**K**) bn : Gotin. |
| **Xeberreş** | (hk.l.çewa) Mirovê ezmanpîs. Ezmanreş. : Wey heware eve çi zarokek xeberreşe!. |
| **Xebitîn** | (k.jn.x.mê) Xebatkirin. Bizavkirin. :Jibona azadîya Kurdistanê em di xebitin.(**K**) bdn: ez di xebitim em di xebitin, tu di xebitî hûn di xebitin, ew di xebite[. . .it] ewan di xebitin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di xebitîm, di xebitîn, di xebitî, di xebitîn, di xebitî, di xebitîn. Db,dûr : xebitîbûm,...bûyn,.bû,...bûn. (**F**) : bi xebite, bi xebitin. |
| **Xebxeb** | (n.dar.mê) **can** Lama binî ya rairov û candaran, ko didan liser rêzbûne. |
| **Xec** | (n.x.mê) 1. Navê jinane. 2.Evîndara siyamendîye di dastana Xec û Siyamend da. |
| **Xeçê** | (hd,gazn.dar. mê) Naznav û navê bankirinê ye jibo pîreka navê wê xec be di hêt gotin. |
| **Xecxecok** | (n.dar.mê) 1.Core kêzeke di firit, li havînan dema balête di kevit tirî, peyda di bin. Zarok yarîyan pêra dikin û vê gotitnê di bêjin :Xecxecokê bi xecîne, tirîye rezan bi helîne[gehîne]. 2. Canewerekê avî ye. yê reş û zere, mîna kimkimane[xemegur]. Ku navê wî di vê mamikê hatîye **mamik** :Zere ji zêrî zertire, reşe ji qêrî[yan poşîyê] reştire. |
| **Xefandin** | (k.jn.mê) Nivandin. Xewandin.:Biçûkî bi xefîne xewa wî di hêt. (**K**) bdn: ez di xefînim em di xefînîn, tu di xefînî hûn di xefînin, ew di xefîne[...itj ewan di xefînin Pr:de[bi]+bdn. Bdb: di xefand, di xefandin. Db,dûr: xefandibû, xefandibûn. (**F**). bi xefîne, bi xefînin. |
| **Xefik** | (n.x.mê) Telheka biçûke jibo girtina çûçik û mişkan ve didin. |
| **Xefîn** | (k.jn.mê) Nivistin. Xewîn. |
| **Xeftan** | (n.x.nêr) 1.Kurtan. 2. Kiras yan sakoyê şor ku di gehe ser gozekan. |
| **Xeftin** | (k.jn.x.mê) Nivistin. Xewtin. |
| **Xelat** | (n.x.nêr) 1. Diyarî.2. Navê mêr û jinane. |
| **Xelatdan** | (k.jn.I.mê) Dema mirov xelatekî bi de êkî. : Mamostayî jiber zîrekîya wan, xelat dan qutabîyên xwe. |
| **Xelatkirin** | (k.jn.l.mê) Xelatekî jibo kesekî ku karekê çak kirîye di Kin diyarî. ;Herkesê zanînan li ser tîroristan bi de cihen havildar, dê hêt xelatkirin. (**K**) bn : Kirin. |
| **Xelek** | (n.x.mê) Tiştê, şêweyê bazinî..:Zincîr ji xelekan pêk di hêt. : Filmê bîst xelekî. |
| **Xelekî** | (hk.dar.çewa) Pora xelekî. Şêweyê xelekî. |

| | |
|---|---|
| **Xelk** | (n.ndiyar.x.nêr) Bireka mirovan. Gel. Kesên ne diyar. **Pend**:XeIk bi çavekî, em jî bi çavekî. Ang; mirov jî wek xelkî. |
| **Xem** | (n.x.mê) 1 .Kovan. Derd. **Pend** :Xemên dilan na hên ser milan.**Pend** :Xem xeman di kêşit.**Pend** :Xem hene lê xemrevîn jî hene. **Pend** :Cuxîn her xema baye.ang; di vê mirov karê her bi ke ci zû yan direng. 2. Pêdivî. Erk. : Xem nake, hema evro li mal be. |
| **Xembar** | (hk.l.çewa) Dilşikestî. Kovandar.:Jiber mirina hevalê xwe ez pir xembarim. |
| **Xembarî** | (n.I.mê) Nexweşî. Kovan. |
| **Xemeba** | (n.I.mê) Derdeke mirovî di girit. |
| **Xemegur** | (n.dar.dz) **candar** Kimkime. |
| **Xemê** | (hk,hd,gazn.dar.mê) Naznav û navek gazîkirinê yê pîrekane. |
| **Xemgîn** | (hn,hk.dar.çewa) 1. Bi xem. Xembar. Kovandar. 2.Navek kurdî ye. |
| **Xemgînbûn** | (k.jn.gl.mê) Bi xem kevtin. Posîdebûn. Dilsarbûn. |
| **Xemgînî** | (n.dar.mê) Xembarî. Dilşikestin. Posîdeyî. |
| **Xemgînkirin** | (k.jn.gl.mê) Posîdekirin. Dilşikandin. : Wexerkirina wî em xemgîn kirîn. |
| **Xemil** | (n.x.mê) Rewş. Ciwanî. : Xemil a darê. |
| **Xemilandin** | (k.jn.mê) Xweşikkirin. Ciwankirin. Rêkûpêkkirin. : Bûk xemiland, ang ; cilên xweşik li ber kirin.(**K**) .Bdn : ez di xemilînim em di xemilînîn, tu di xemilînî hûn di xemilînin, ew di xemilîne[. . . .it] ewan di xemilînin. Pr : dê[bi] + Bdn. Bdb : di xemiland, di xemilandin. Db,dûr : xemilandibû, .. bûn. (**F**) : bi xemilîne, bi xemilînin. |
| **Xemilandî** | (rd.dar.çewa) Ciwankirî. Xweşikkrî. : Eve meheke bajêrê rm yê xemilandîye jiber hatina cejna Newrozê. |
| **Xemilîn** | (k.jn.x.mê) Ciwanbûn. Bi xemil kevtin. : Li biharan dol çiya di xemilin. |
| **Xemilkirin** | (k.jn.l.mê) Xemilîn. Xemilandin. : Biharê xemil a xwe kir. |
| **Xemrevandin** | (k.jn.I.mê) Xwe ji bîrve kirin. Xwe mijîlkirin jibo xemên xwe bi revînin. : Da bi çîn geryanekê qemî xemêd xwe piçek bi revînîn. |
| **Xemrevîn** | (hn,hk.I.çewa) Kesê bi axivtinên xweş û şirîn xerna ji bîra mirovî di bit.keyfxweş. **Pend** : Xem hene û xemrevîn jî hene. |
| **Xemrî** | (hk.x.çewa) **reng** Rengê şîn û sor yên têkel. Mor. |
| **Xemsar** | (hk.I.çewa) Mirovê di kar û kiryarên xo da bê xem. Ne Rijd. Tembel |
| **Xemsarî** | (n.l.mê) Pûte nedan bi karî. Ne kirina karî yan nîvbero hêlan. Piştguh ve havêtin |
| **Xemsarîkirin** | (k.jn.gl.mê) Karê xwe bi diristî bi rêve ne birin. : Te gelek xemsarî di karê xwe da kir, jiber hindê tu bi ser ne kevtî. |
| **Xemxor** | (hk.I.çewa) Mirovê karî bi giringî di wergirit. Kesê xwe mandî di ket. |
| **Xemxwarin** | (k.jn.I.mê) 1. Xem û kovan li xwe kom kirin. Xem ji Xwera çêkirin. 2. kar bi rijdî wergirtin û encamdan. : Ew pir xemê ji karê xwe di xwe. |
| **Xemxwer** | (hk.I.çewa) bn :Xemxor. |
| **Xen** | (hk.x.çewa) Xîçên sor. : bizina xen ,ang; bizina xîçên sor li serûçavên wê. |
| **Xena** | (n.x.mê) Keresteyeke,rengeke di por û destan di din dako sor bi bin. |

| | |
|---|---|
| **Xencer** | (n.x.mê) Satoreka tîje wek şûre, bi destik û kavlane di ber şîtika xwe ra di kin. **Pend** :Xencer biraye, tiveng pismame. Ang ; Xencer herdem di gel mirovî daye ya desthile. |
| **Xendek** | (n.x.mê) Tapî. |
| **Xendiqandin** | (k.jn.dar.mê) Fetisandin. Desthefkênan.(**K**) bdn: ez di xendiqînim em di xendiqînîn, tu di xendiqînî hûn di xendiqînin, ew di xendiqîne[...itj ewan di xendiqînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di xendiqand, di xendiqandin. Db,dûr : xendiqandibû, .... Bûn. (**F**) : bi xendiqîne, bi xendiqînin. |
| **Xendigîn** | (k.jn.x.mê) Mirov yan lawir di bin avê de di fetisin. (**K**) bdn : ez di xendiqim em di xendiqîn, tu di xenciqî hûn di xendiqin, ew di xendiqe[. . .qe] ewan di xendiqin. Pr : dê[bi] + bdn. Bdb : di xendiqîm, di xendiqîn, di xendiqî, di xendiqin, di xendiqî, ewan di xendiqîn. Db,dûr : xendiqîbûm,...bûyn,..bû,...bûn. (**F**) : bi xendiqe, bi xendiqin. |
| **Xepare** | (n.x.mê) Kolana erdê çandî bi tevir û meran, jibo zaxkirinê. |
| **Xeparekirin** | **(k.jn.I.mê) Kolana binê hişînkati. (K) bn: kirin.** |
| **Xepik** | **(n.x.raê) Tepik. Xefik.** |
| **Xepirandin** | **(k.jn.raê) Xeparekirin. : Binê sêvan bi tevirî di xepirîne. (K) bdn: ez di xeprînim em di xepirînîn, tu di xepirînî hûn di xepirînin, ew di xepirîne[..it] ewan di xepirînin. PR: dêbi hûn di xepirînin, ew di xepirîne[..it] ewan di xepirînin. PR: dêbi + bdn. Bdb : di xepirand, di xepirandin. Db,dûr : xepiradibû, …bûn . (F) :bi xepirîne, bi xepirînin.** |
| **Xepînok** | **(hk.dar.çewa) bn :Xapînok.** |
| **Xerar** | **(n.x.nêr) bn:Xirar.** |
| **Xerat** | **(pîşn.x.dz) Dartiraş.** |
| **Xerbend** | **(kam.dar.dz) I. Kesê bi dewaran xwarin mitayî ji cihekî bo yê dî di veguhêze. 2. Bend. Reben. Xizetkar. Dîl.** |
| **Xerçeng** | **(n.dar.dz) candar Kêvjale.** |
| **Xeritandin** | **(k.jn.x.raê) Renînîn. Tiraşîn. Gogirandin. :Destikê bivir î xeritand. Ang ; hilû kir.(K) bdn : ez di xeritînim em di xeritînîn, tu di xeritînî hûn di xeritînin, ew di xeritîne[...itj ewan**<br>**di xeritînin.Pr :dê[bij+bdn. Bdb : di xeritand, di xeritandin. db,dtir : xeritadnibû, xeritandibûn. (F) : bi xeritîne, bi xeritînin.** |
| **Xerîk** | **(hk.x.çewa) Mijîl. Mijûl. :Evan rojan ez xerîkim, xanî ava bi' k em .** |
| **Xerman** | **(n.x.raê) Cuxîn.** |
| **Xermaşe** | **(n.dar.mê) Amêrekê pencpene û destikek heye, jibo pakijkirina zevîyan ji dexel û giyayên bêwic herwesa hilîkirina erdî bi kar di hêt. Binkol. Kilêb.** |
| **Xermasekirin** | **(k.jn.l.raê) Bi xermaşeyî zevî, zer bîstan hilû û ji giyayî paqijkirin.** |
| | **731** |
| **Xermasekirî** | **(hk.I.çewa) Erdê bi xermaşeyê hafî çêkirin. :Rezê xermaşekirî.** |
| **Xermisandin** | **(k.jn.mê) bn :Xerpişandin.** |
| **Xermoşk** | **(n.dar.mê) Penc. Nînok.** |
| **Xernof** | **(n.x.mê) Xurnîfk..** |
| **Xerpişandin** | **( k.jn.dar.raê) Verûşandin. Zwîrikandin. Pencirîk lêdan.** |

| | |
|---|---|
| **Xerpûng** | **(n.dar.raê) Pûng. Pîng.** |
| **Xert l** | **(hk.x.çewa) Nemana mitayî..** |
| **Xert 2** | **(n.x.mê) Amêreke, darek kivanî û divêlek qayîm, piranî ji kevilî ye, di şîşikeka tîj di alînin serê tîjê şîşikê liser dar yan depekî di danin bi destî darê kivan di hînin û di bin dako wî darî yan depî bi simin..** |
| **Xertbûn** | **(k.jn.l.mê) Bi dawî htina berê daran. fêqîyê daran. :Sêv yên xert bûyn . :Tirî xertbtiye?. :Gundor xert bûne. (K) bn: Bûn.** |
| **Xertkirin** | **(k.jn.l.raê) Kar bi amêrê xertî kirin. :Dep xertkirin. Anko simtina darî bi amêrê xertî.** |
| **Xerz** | **(n.x.nêr) Hêkên candaran yên hûrik û kora.Tov.: Xerzê spihan, xerzê nav zikê rairîşkan.** |
| **Xerzkirin** | **(k.jn.I.mê) Wekî candar xerzê xwe liser dar, belg, cilik û htd di kin. :Xalxalokê xerzê xwe liser tayê darê kirîye.** |
| **Xes** | **(n.x.raê) çandin Giyayekê keske, belgên wê Xemildarin, bi xavî di gel zadî yan lênan di hên xwarin.** |
| **Xesandin** | **(k.jn.x.raê) 1. Karekê nojdarîyê ye endamê guhnelîyê yê lawiran ji kar di êxin ,ku nikarit bi perit.(K) bdn :ez di xesînim em di xesînîn, tu di xesînî hûn di xesînin, ew di xesîne[. . .itj ewan di xesînin. PR:dê bi + bdn. Bdb : di xesand, di xesandin. Db,dûr: xesandibû, ...bûn. (F): bi xesîne, bi xesînin. Hesp xesand. Nêrî xesand. 2. Çend kelan di hînin zadî ku guherîn bi kevit tama wî û ya nexweş ji nav derkeve.: Karî xesandin. Nîsk xesandin.** |
| | **732** |
| **Xesandî** | **(hk.x.çewa) I . Candarê nêr yêhedamên guhnelîya wî hatîn ji kar xistin.2. Zadê çend kelek hatînê û tam û rengê wî hatîn gihoran.** |
| **Xesas** | **(kam.x.dz) Mirovê karê xesandina candaran di ke.** |
| **Xesasî** | **(kara.dn) Karê xesandina giyaneweran. Karê xesasî.** |
| **Xest** | **(hk.x.çewa) made Çir. Tîr.** |
| **Xestexane** | **(n.I.mê) Nexweşxane.:Xestexaneya Azadî. Xestexana mezin.** |
| **Xesî** | **(n.x.raê) bn :Xesû.** |
| **Xesok** | **(kar.dar.dn) bn :Xesas.** |
| **Xesû** | **(n.x.raê) Dayka jinê jibo mêrî, yan dayka mêrî jibo jinê. Pend : Xesûyê jibo te di bêjim, btikê guhê xwe bi dê.ang; dema mirovî bi vêt bi awayekê ne êkser gotina xwe bi gehîne êkî.** |
| **Xetimîn** | **(k.jn.x.Iê) Kun, borî, lûlî û htd di hên girtin û av yan ba di nav de naçit.: Solîna cadê ya xetimî, av têra naçit. :Jêrav xetimî.** |
| **Xew** | **(n.x.raê) Nivistin. Pend : Kew û xew bi hevra nabin. ang ; dema mirov karekî bike nabit guh bi de ji dest danana karek din.** |
| **Xewar** | **(hk.dar.çewa) Xewte.** |
| **Xewgeh** | **(hk.cih,n.dar.mê) Cih yan jora xewê. Jora nivistinê.** |
| **Xewgiran** | **(hk.I.çewa) Mirovê zû ji xew ra nabe. Dema xew di ke mîna mirîyane.** |
| **Xewhatin** | **(k.jn.I.raê) Dema canê mirov û lawiran sist di be û niqosk di hênê, di xwazin xew bi kin. :Xewa min di hêt dê çin bi nivim.** |

| | |
|---|---|
| **Xewin** | **(n.dar.raê) 1 . Bûyerên mirovê nivistî di bînit. Hizrên mirov di xew de di bîne. Pend : Xewnên kanînan, wek tirên mahînan. Pend :Heger mirovî êk ne vêt, xewnan pêve di bînit.2. Hîvî.** |
| **Xewindîtin** | **(k.jn.I.mê) I. Mirov di xew da bûy em n di bîne.2. Leşpîsbûn.(K) bn : Dîtin.** |
| **Xewinîn** | **(k.jn.I.mê) Agir xweşbtin. Agir geşbûn. : Agirê tenûrê yê xewinî.** |
| **Xewkirin** | **(k.jn.I.mê) Nivistin. Mirov di nive. Razan. (K) bn : Kirin.** |
| **Xewle** | **(hk.x.çewa) Nediyar. Ne xuya.** |
| | **733** |
| **Xewlekirin** | **(k.jn.l.raê) Xilwekirin. Varêkirin.** |
| **Xewnexoş** | **(hk.I.çewa) Mirovê di xew da pir di livit û ji ser cihê xwe di çit.** |
| **Xewnexweş** | **(hk.I.çewa) bn :Xewnexoş.** |
| **Xewsivik** | **(hk.I.çewa) Mirovê bi sanahî û zû ji xew ra di bit û leşê wî sivik.** |
| **Xewte** | **(hk.dar.çewa) Mirovê pir hez ji xewê di ke.** |
| **Xewxoş** | **(hk.I.çewa) Mirovê li dema nivistinê bêdeng û bê bizav. : Ev zaroke gelek yê xewxoşe, ta spêdê xwe na livînt.** |
| **Xewxweş** | **(hk.l.çewa) bn :Xewxoş.** |
| **Xeyidandin** | **(k.jn.x.mê) Torekirin. Hêriskirin.(K) bdn: ez di xeyidînim em di xeyidînîn, tu di xeyidînî hûn di xeyidînin, ew di xeyidîne[..it] ewan di xeyidînin. Pr: dê [bi] + bdn. Bdb : di<br>xeyidand, di xeyidandin. Db,dûr: xeyidandibû, xeyidandibûn. (F): bi xeyidîne, bi xeyidînin.** |
| **Xeyidîn** | **(k.jn.x.mê) Torebûn. Hêrisbûn. Silbûn. Zîzbûn. (K) bdn: ez di xeyidim em di xeyidîn, tu di xeyidî hûn di xeyidin, ew di xeyide ewan di xeyidin.Pr: dê[bij + bdn. Bdb: di xeyidîm, di xeyidîn, di xeyidî, di xeyidîn. Xeyidî. Db,dûr .Xeyidîbûm,...bûyn,...bûy, ..bû,...bûn. (F) : bi xeyide, bi xeyidm.** |
| **Xezal** | **(n.x.mê) candar Mamiz.** |
| **Xezam** | **(hk.d em ) werzê salê Payîz.** |
| **Xezan** | **(hk.x.çewa) Hejar. Belingaz.** |
| **Xezanbûn** | **(k.jn.I.raê) Hejarbûn. Belingazbûn.** |
| **Xezanî** | **(n.dar.raê) Hejarî.** |
| **Xezankirin** | **(k.jn.I.raê) Hejarkirin. Belingazkirin.** |
| **Xezûr** | **(n.x.nêr) Babê mêrî jibo jinê, yan babê jinê jibo mêrî.** |
| **Xêl** | **(hk.x.çewa) Vîr. Çavtirîwar.** |
| **Xêlbûn** | **(k.jn.I.mê) Vîrbûn.** |
| **Xêlî 1** | **(n.dar.mê) Vîrî. Çavtirîwarî. :Xêlîya çavên wî jê di hêt.** |
| **Xêiî 2** | **(n.x.mê) Pêçeya ser ser yan milên btikan.** |
| **Xêye** | **(n.x.nêr) 1. Fêqîyê ji nû gehişti. 2. Navê mêrane.** |
| | **734** |
| **Xêvekirin** | **(k.jn.l.mê) Xwarina fêqîyê nû gehayî.:Başbû min evsale jî hijîr xêve kirin. (K) bn: Kirin.** |
| **Xêvzan** | **(kam.dar.dz) Mirovê bi pêşeroja xelkî di zane. Falveker.** |

| | |
|---|---|
| **Xêz** | **(n.x.mê) Xîç. Hêl.** |
| **Xêzan** | **(n.x.mê) Mal.Malbat. Ninemal :Xêzana me ji deh kesan pêk dihêt.** |
| **Xêzandar** | **(hk.dar.çewa) Xwedî xêzan. Xudan malbat. Zelamê xêzandar;ang, zelamê xudan jin û zarok.ê** |
| **Xêzkişandin** | **(k.jn.I.raê) Xîçkêşan.** |
| **Xifitan** | **(n.x.dz) Yê ko kelûpelan di kirit. Bikir.** |
| **Xiftan** | **(n.x.mê) Êlekên jinan û mêran.** |
| **Xilav** | **(n.dar.mê) Xwelî.Xolî.** |
| **Xilinkî** | **(hk.x.çewa) Ji gehçûna hestî.Xilyayî.** |
| **Xilinkîbûn** | **(k.jn.I.raê) Ji gehçûna hestî. Xilyan. :Dest xilinkî bû. (K) bn: Bûn.** |
| **Xilinkîn** | **(k.jn.x.raê) Xilyan. Ji gehçûn. :Destê lîstikvanî yê xilinkî.** |
| **Xiloiç** | **(hk.x.çewa) Vala. :Erdê xilole.** |
| **Xilolebûn** | **(k.jn.I.raê) Valayî di nava erdekî da çêbûn.** |
| **Xilolekirin** | **(k.jn.I.raê) Valayî di cihekî da çêkirin.** |
| **Xilt** | **(k.x.raê) derd Core derdeke çerim ê mirovî kul di bit.** |
| **Xilxile** | **(hk.cih,n.dar.raê) Cihê pirî ber û kevir.** |
| **Xilwekirin** | **(k.in.I.raê) Mirov jibo yekî bi tenê bi axivit. Varêkirin. (K) bn: Kirin.** |
| **Xilyan** | **(k.jn.x.raê) Xarbûn yan êşaneka raezin, eg em kevtinê yan gurzekî, li dest, ling, tibil û htd, bê ko bi şikêt. Ji gehçtin.** |
| **Ximav** | **(n.dar.raê) Şileyek rengîne, şîn, sor, kesk, zer û htd di kin qeleman jibo nivîsandinê. Rengav.** |
| **Ximavdank** | **(n.gl.raê) Araanê têda paraztina ximavê.Rengavdan.** |
| **Ximxim** | **(n.dar.raê) Kun û perên difina mirovî.** |
| **Ximximbes** | **(hk.gl.çewa) Mirovê kunên kepîya wî di vekirî û beş.** |
| | **735** |
| **Xinavke** | **(n.x.raê) Ristik. Stovank.** |
| **Xinzirîn** | **(k.jn.x.mê) Torebûn. Azirîn. Hêrisbûn. : Kitik xinzirî. (K)bdn: ez di xinzirim em di xinzirîn, tu di xinzirî hûn di xinzirin, ew di xinzire[....it] ewan di xinzirin. Pr:dê[bi]+bdn.<br>Bdb : ez di xinzirîm em,hûn,ewan di xinzirîn, tu,ew di xinzirî.Db,dûr : ez xinzirîbûm, em xinzirîbûyn(bûn), tu xinzirîbûy hûn xinzirîbûn, ew xinzirîbû. (F) : bi xinzire, bi xinzirn.** |
| **Xir** | **(hk.x.çewa) 1. Girovir. :Gundor xire. :Tepika yarîyan xire. 2. Hemû. : Qutabîyên pola pêncê xir serkeftin.** |
| **Xirab** | **(hk.x.çewa) Nebaş. Neçak. Pîs. Gemar.Herifî. :Karê xirab şerim û belaye.** |
| **Xirabbûn** | **(k.jn.I.raê) Pîsbûn. Wêranbûn. Genîbûn. :Zadê xirab bûy. (K) bn: Btin.** |
| **Xirabî** | **(n.dar.raê) Karê ne rewa. :Xwe ji xirabîyan dûr bêxin!.** |
| **Xirabkirin** | **(k.jn.I.raê) Pîskirin. Herifandin. Pend :Mala xo bi destên xo xirab di kin. (K) bn: Kirin.** |
| **Xirandin** | **(k in I mê) 1 . Ji rê derkevtin. Ji rêya rast derêxistin"""2 Rirêşan. (K) bdn: ez di xirînim em di xhînîn, tti di xirini hun di xirînin, ew di xirîne[. . .itj ewan di xmnm.Pr: de[bij + bdn. Bdb: di xirand, di xirandin.Db,dûr:** |

| | |
|---|---|
| | xirandibûra,xhandibûyn,xirandibûy,xirandibu, xirandibun. (V) . bi xirîne, bi xirînin. |
| Xirar | (n.x.nêr) Ferdê raezin. Gûnîyê mezin. |
| Xirbûn | (k.jn.l.mê) 1. Civîn. Kombûn. :Gundî li mala melayî xir bûne.2. Girovirbûn. :Girika hevî di destan da xir bû.(K) bn: Bûn. |
| Xirelç 1 | (hk.x.çewa) Hilî. Pûç. Mehyayî. :Bixûyê xirek. |
| Xirek 2 | (hk.çewa)Hemû. Gişt. |
| Xirekbûn | (k.jn.I.mê) Mehyan. :Didannkên birxûyî yên xirek bûyn. (K) bn: Bûn. |
| Xirekkirin | (k.jn.I.mê) Mirov didankên tiştekî bi mehînit. Jê bi bit.(K) bn : Kirin. |
| Xirepisan | (n.dar.mê) Xwe lêkdan, nemaze xwe lêkdana pişîkan. |
| Xirexir | (n.l.mê) Xirxir. |
| Xirexirkirin | (k.jn.gl.mê) Xirxirkirin. |
| | 736 |
| Xirê | (hk.hd.dar) Naznav û bankirina jina xir. |
| Xirik | (n.dar.mê) Xelek. Gîx. |
| Xirink | (hk.x.çewa) Ciwan. Rind. :Pîrekeka xiring. |
| Xirîk | (n.x.mê) Girîyeka bi zêmar. |
| Xirîkçûn | (k.jn.I.mê) Girîya bi xirîk. : Ev jine ya di xirîk çtiyî ji girîyan da.(K) bn: Çtin. |
| Xirkirin | (k.jn.I.raê) 1. Korakirin. Civandin. :Şivanî pez li bin daran xir kir.2. Girovirkirin. :Girikêt xwe xir bi ke.(K) bn: kirin. |
| Xirmexirm | (n.I.raê) deng Dengê devê mirov û candaran dema xwarineka req di xon. :Ximexirma devê bizinê ye ya nanê hişk di xwe. |
| Xirmiçandin | (k.jn.mê) Bi pencan zîrikandin. Rûşandin.(K) bdn: ez di ximiçînimem di ximiçînim, tu di ximiççînî hûn di xirmiçînin,ew di ximiçîne[...itj ewan di ximiççînin. Pr:dê[biJ+bdn. Bdb: dixirmiçand, di ximiçandin. Db,dûr: ximiçandibti, xirmiçandibûn. (F): bi ximiçîne, bi xirmiçîne. |
| Xiro | (hdgaz.nêr) Naznav û bangkirina peyayê xir. |
| Xirosk | (k.x.nêr) Dîkil. Kirosk. |
| Xirp | (hk.x.çewa) Qelew. Ph. |
| Xirpek | (hk.dar.çewa) Erdê kêlayî. Zevîya kolayî. Xirmaşekirî. |
| Xirpik | (n.x.raê) can Kirkirok. |
| Xirpin | (hk.x.çewa) Qelew. Girovir. |
| Xirş | (hk.x.çewa) Bêber. Stewir. : Bahîva nav rezê me ya xirşe. |
| Xirşbûn | (k.jn.I.mê) Darûbarên nexweş di bin û êdî berî nagirin. |
| Xirtik | (n.dar.mê) derd Koxka dengê xirtexirtê jê di hêt. Xendxendok. |
| Xirtxirt | (n.dar.mê) deng Dengê vekolana axê. : Xirtxirta mişkî ye di bin dîwarî ve. |
| Xirtxirtkirin | (k.jn.l.raê) Xirtxirtê ji erdî di hîne.(K) bn: Kirin. |
| Xirvebûn | (k.jn.gl.raê) Dubare li hev civyan. (K) bn: Bûn. |
| Xirvekirin | (k.jn.gl.raê) Carek din li hev xir kirin. :Gundî dubare xirvebûn.(K) bn: Kirin. |
| Xirxal | (n.dar.raê) 1 . Tayên tirombêlan. 2. Bazinê lingan. |
| | 737 |

| | |
|---|---|
| **Xirxir** | **(n.l.mê) deng Dengê ji dev û difînên mirovê nivistî der di kevit, mîna xirêna kitikan.** |
| **Xirxire** | **(hk.dar.çewa) Mirovê gir, lêkdayî û pan. :Lewend zelamek xirxireye.** |
| **Xirxirkirin** | **(k.jn.gl.mê) Mirovê nivistî yê xirxir jê di hêt.** |
| **Xiryan** | **(k.jn.x.mê) Di serda çûn. Ji rê derkevtin.** |
| **Xistin** | **(k.jn.x.raê) Êxistin.** |
| **Xişan** | **(k.jn.dar.mê) Li erdî kêşan. Xirandin. (K) bdn: ez di xişînim em di xişînîn, tu di xişînî hûn di xişînin, ew di xişîne[....itj ewan di xişînin.Pr: dê [bij + bdn. Bdb: di xişand, di xişandin. Db,dûr: xişandibû,xişandibûn. (F): bi xişîne, bi xişimn.** |
| **Xisan** | **(k.jn.x.mê) Liser erdekî vezelyan. Tehisîn.** |
| **Xişên** | **(n.dar.raê) deng Dengê belg û daran ji lingên mirov û lawiran, yan livîna adîyan di hêt.: Te guh li xişêna marî heye!.** |
| **Xişênkirin** | **(k.jn.l.mê) Dengê xişênê ji xwe anîn, hatin. (K) bn :Hatin.** |
| **Xişîm** | **(hk.x.çewa) Nezan. Ne şareza.** |
| **Xişkok** | **(hk.dar.çewa) Rind. Ciwan. Xweşik. :Keçeka xişkok. :Xortekê xişkok.** |
| **Xişok** | **(hk.dar.çewa) Candarên Xwînsar hêkker, yan di zên û xwe li edrî di xişînin, wek mar û margîskan.** |
| **Xişte** | **(n.x.mê) Lîsteyeka bi xîçan û malikan berhevkirîye jibo zanyarîyan.** |
| **Xişxiş** | **(n.dar.mê) deng Xişên.** |
| **Xişxişkirin** | **(k.jn.gl.mê) Lawir û mirov xişênê di kin. (K) bn: Kirin.** |
| **Xişxişok** | **(n.l.mê) Alaveke zarok di destên xwe di girin jibo tenabûnê ko bi hijandinê dengê xişxişê jê di hêt.** |
| **Xişyan** | **(k.jn.x.mê) Li ser erdî hatin xişandin. : Berek ji kendalî xişya.** |
| | **Xiyar (n.x.nêr) Aro.** |
| | **738** |
| **Xizan** | **(hk.x.çewa) 1 .Nezan. Xişîm. :Xortê xizan. : Jina xizan. 2. Hejar.** |
| **Xizanbûn** | **(k.jn.I.raê) Hejarbûn. (K) bn: Btin.** |
| **Xizanî** | **(n.dar.mê) I. Hejarî.2. Nezanî. :Derdê xizanîyê pir girane.** |
| **Xizar** | **(n.x.nêr) Mişar.** |
| **Xizêm** | **(n.x.raê) Parçe zêreke mîna liban yan guharan jin li poz[difinJ a xwe di kin. Qenefin.** |
| **Xizim** | **(n.x.nêr) I. Birayê yan mirovên jinê jibo mêrî yan mirovên wî. Bîra. 2. Kesûkar.** |
| **Xizîne** | **(n.x.mê) Defîne. Gencîne.** |
| **Xizîran** | **(hk.dem, n.x.mê) Meha yekê ji havînê. Cehzeran. Pend:Xizîran xinziri, çi tişt xwe li ber na girî, ji bilî xurnîf û mêwa tirî.** |
| **Xizmatî** | **(n.dar.raê) Mirovanti. :Me di gel wan xizmati ya kirî.** |
| **Xizmet** | **(n.x.mê) Alîkarî. Xebat. :Xizmeta te na hêt ji bîr kirm.** |
| **Xizmetkar** | **(kam.I.dz) Kesê xizraetê di ke.** |
| **Xizmetkirin** | **(k.jn.I.raê) Alîkarîkirin. Xebatkirin. Xebitîn. :Kesê ximetê bi ket li nik xelikî xweşdivî ye.** |

| | |
|---|---|
| **Xizxizok** | **(n.dar.raê) derd Bêhinkurtkî.** |
| **Xîç** | **(n.x.raê) Hêl. Gîx. :Xîça firokeyan. Xîça marî.** |
| **Xîçbûn** | **(k.jn.I.raê) Xîç di kevin cihekî sedema bi hev kevtin yan lêk xişyanê. (K) bn: Bûn.** |
| **Xîçik 1** | **(n.dar.raê) Xîça biçûk.** |
| **Xîçik 2** | **(n.dar.nêr) Benîşt. Qaçik.** |
| **Xîçkês** | **(n.I.nêr) Alaveke, ji dep, lastîk, asin û htd hatî diristkirin jibo kêşana xîçên rast liser erd yan kaxezan. Raste.** |
| **Xîçkêşan** | **(k.jn.I.mê) Çêkirina xîçan. Çêkirina xîçikan bi xîçkêşan.(K) bn: Kêşan.** |
| **Xîçkirin** | **(k.jn.I.raê) Mirov xîçekê li cihekî bi kêşit. (K) bn: Kirin.** |
| **Xîsên** | **(n.dar.raê) deng Dngê kelaştin yan birîna leşî û tiştan. : Kêrek li tilîya xwe da xîsên jê hat.** |
| **Xîsk 1** | **(n.x.mê) îsk.** |
| | **739** |
| **Xîsk 2** | **(hk.cih) Cih, gir , erd ên xîzî.** |
| **Xîskandin** | **(k.jn.raê) Xîst hatin mirovî. îskvedan.(K) bdn: ez di xîskînim em di xîskînîn, tu di xîskînî hûn di xîskînin, ew di xîskîne[ ...it]ewan di xîskînin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb : di xîskand<br>di xîskandin. Db,dûr: xîskandibû, xîskandibûn. (F): bi xiskine, bi xîskînin.** |
| **Xîsldn** | **(k.jn.mê) Xîsk berdan. îsk hatin mirovî.** |
| **Xîskkişandin** | **(k.jn.I.mê) îsk vedan.îsk hatin.** |
| **Xîyet** | **(n.x.raê) Çadir. Kon. Reşmal.** |
| **Xîvetvedan** | **(k.jn.gl.mê) Hildan û berhev kirina xîvetê jibo bi kar anînê.** |
| **Xîz** | **(n.x.nêr) Corekê hûrik yê axa ber avane, jibo avayîyan di gel çîmentoyê têkel di kin.** |
| **Xîzik 1** | **(n.dar.raê) Xîçik. Gîx.** |
| **Xîzik 2** | **(n.dar.nêr) Beten, gir,erdê bi xîz. Xîsk.** |
| **Xîzikkisandin** | **(k.jn.I.raê) Xîçkêşan.** |
| | **Xîzkirin (k.jn.I.mê) Xîzî li erd, cade, hewş ban û htd di kin. (K) bn: Kirin.** |
| **Xo** | **(cihn) rêzman Hebûn.Xwe. Ez bi xo, Here mala xo. Bo xo bi xwîne.** |
| **Xobixo** | **(hk.dar.çewa) Ser bi xwe. Tenê.** |
| **Xodîk** | **(n.dar.mê) Qodîka mirov xwe têra di bînit. Neynik.** |
| **Xol** | **(n.x.raê) Zandor.** |
| **Xolgeh** | **(hk.cih,n.x.raê) bn:XuIke.** |
| **Xoiî** | **(n.x.mê) Arê sipî ye ji encama şewitina tiştan peyda di bit. Xwelî.** |
| **Xolîdank** | **(n.dar.raê) Amaneke xolî û bermayîyên cigaran tê di ken.** |
| **Xonçe** | **(n.x.mê) Pijkovk. Pişkvk** |
| **Xopan** | **(hk.x.çewa) Wêran. Kavil. Çam. Şikestin. . :Paş xopana sala1976 ew peyda bûye.** |
| **Xopanbûn** | **(k.jn.l.mê) Kavilbûn. Wêranbûn.** |
| **Xopanldrin** | **(k.jn.l.mê) Kavilkirin. Wêrankirin. Herifandin. Erdhejê gun xopan kir.** |
| **Xorak** | (n.x.mê) Xwarin. |

| | |
|---|---|
| **Xort** | (hk.x.çewa) Genc. Law. Cihêl.Peyt. : Ew xortekê hêja ye. :Ha xorto eve tuyî?. ***Pend*** :Ava xortan serevraze. ang; Karînên mirovê xort di bê tixûbin. |
| **Xortanî** | (n.dar.mê) Cihêlî. : Min her ji xortanîya xwe hez ji geryanê di kir. |
| **Xortxapînok** | (hk.l.çewa) Keça bi cil û livînên xwe yên direw û taybetî, bala xortan di kişîne. |
| **Xoş** | (hk.x.çewa) Bi tam. Balkêş. Dilveker. Xweş. Evro rojeka xoşe. :Xwarineka xoş ji mera çêke. |
| **Xoşav** | (n.l.mê) 1.Av û mêwîjan têkel dikin ta tama wê xweş û şirîn di be. 2.Ava fêqî.Doşav. |
| **Xoşbûn** | (k.jn.l.mê) Bi tam bûn. Dilvekerbûn. Tenabûn. Lêborîn. |
| **Xoşdivî** | (hk.l.çewa) Mirovê şirîn ko hemû kes hez jê di kin.Xoştivî. |
| **Xoşewîst** | (hk.l.çewa) Xoşdivî. Xoştivî. |
| **Xoşkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov xwarinekê xoş çê bike. Mirov cihekî, dîwanekê, malekê û htd bi rewş bêxe. :Bajêrvanîyê gundê me gelek xoşkirîye paş av û kareb gehandînê. |
| **Xox** | (n.x.mê) ***fêqî*** şeftalû. |
| **Xozge** | (pêrb.slv.xoz) bn :Xozî. |
| **Xozî** 2 | (pêrb) ***rêzman*** Alavê hez û xewinan. Xwezî. |
| **Xozî** 1 | (n.x.mê) Tif. : Ji tirsan xozîya xo daqurtand. |
| **Xuda** | (n.x) Xudanê erd û esmanan. Ezdan. Xweda. |
| **Xudan** | (n.x.dz) 1. Xwedê. 2. Xwedîyê kar, mal, rez, bax û htd. |
| **Xudankirin** | (k.jn.l.mê) Sexbêrîkirin. Çavê xwe danê. Perwedekirin. Xwedîkirin. Candar xudankirin. Zarok xudanirin. (K) bn : Kirin. |
| **Xudayî** | (hk.dar.çewa) Kar yan bûyera ji xudê ye û bêy karînên mirov di bit. : Mirin karek xudayî ye çi bi destê mirovan nîne. |
| **Xudê** | (n.x) Xuda. Xweda. |
| **Xudîk** | (n.l.mê) bn :Xodîk. |
| **Xuh** | (n.x.mê) Aveka tam swîre jiber westanê û germê,ji giyanê mirovî der di keve. : Bi xuha enîyê, zarokên xwe xudan di ket. |
| **Xuhdan** | (k.jn.l.mê) Leşê mirovî xuhê der di ke. :Ezê xuhdayî me. : Xuh da. (K) bn: Dan. |
| **Xulam** | (pî1n.x.nêr) Xizmetkarê li nav malan kar dike. ***Pend***:Xulamên axa, her axane.ang; yê têkelîya mirovên mezin bi ket, wek wane. |
| **Xulamînî** | (karn.dar.mê) Karê xulaman. |
| **Xulke** | (n.x.mê) Yekeyeka demîye ji 60 çirkeyan pêk di hêt. Her demhijmêrek 60 xulkeye. |
| **Xumalî** | (hk.l.çewa) Pertal, xwarin, cilik ên li mal di hên çêkirin. Rûnê xumalî. Rûnê pezî yê ko li mal di hêt kirin. |
| **Xumalî** | (hk.l.çewa) Pertal, xwarin, cilik ên li mal di hên çêkirin. Rûnê xumalî. Rûnê pezî yê ko li mal di hêt kirin. |
| **Xumên** | (n.x.mê) ***deng*** Dengê top û tivengan dema li çiyan deng ve di det. |
| **Xumîn** | (n.x.mê) bn:Xumên. |
| **Xumxum** | (n.dar.mê) Top. |

| | |
|---|---|
| **Xunav** | (n.dar.mê) 1. Çipikên ava spêdeyan liser gul û giyayî dirist di bit. 2. Navê jinane. |
| **Xunavgirtin** | (k.jn.l.mê) Xunav liser gul û giyayî peyda bûn. :Xunavê belgên gula girtin. (K) bn: Girtin. |
| **Xunçe** | (n.x.mê) bn:Xonçe. |
| **Xundin** | (k.jn.x.mê) Vexwandin. Daxazkirin. : Wan gundî xundine jibo şahîya lawê xwe. |
| **Xundî** | (hk.dar.çewa) Xandî. |
| **Xunivîn** | (k.jn.x.mê) Barîna barana hûrik. Xunav barîn. |
| **Xunkar** | (karn.dar.dz) Paşa. Kiral. |
| **Xur** | (n.x.mê) Xuran.Xuryan. |
| **Xuran** | (k.jn.x.mê) Hesteke leşê mirovî pêdivî bi gemirandinê di bit. Xuryan. (K) bdn: ez di xurim em di xurîn, tu di xurî hûn di xurin, ew di xure[….it] ewan di xurin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di xuram,di xuran, di xuray, di xura. Db,dûr : xurabûm, …bûyn, bûy, bû, ..bûn. (F) bi xure, bi xurin. |
| **Xurandin** | (k.jn.l.mê) 1. Mirov xwe yan yekî di xurînit. 2. Qayîlkirin. Kehîkirin. (K) bdn : ez di xurînim em di xurînîn, tu di xurînî hun di xurînin, ew di xurîne[….it] ewan di xurînin. Pr : dê[bi] + bdn. Bdb : di xurand, di xurandin.Db,dûr : xurandibû,xuradibûn. (F) bi xurîne, bi xurînin. |
| **Xurçik** | (n.dar.mê) Mêdek. Buxçik. Cihork. |
| **Xurek** | (n.dar.mê) Xwarin. Zad. |
| **Xurekpêj** | (n.l.dz) Kesê xurekê di lênit. |
| **Xurekxane** | (hk.cih,n.l.mê) Jora xwarin lê dihêt lênan. Xwaringeh. |
| **Xurist** | (n.l.nêr) Ti1tê bi xwe werarê di kit bê destkarî ya mirovan. Xweza. |
| **Xuristî** | (hk.l.çewa) Xwezayî. |
| **Xurî** | (hk.x.çewa) Sade. Bi tenê. Peyva xûrî, mîna : ser, dar, Aza, bira û htd. rûnê xurî. |
| **Xurîk** | (n.dar.pirîn) Derdeke pirsik li leşê mirovî di hên û cihê wan wek pinîyan di mînin. |
| **Xurîn** | (k.jn.x.mê) 1.Bi dengek bilind bangkirin. Gazîkirin. Lê heytan. 2. Dengê şêran. 3. Xuryan. (K) bdn: ez di xurim em di xurîn, tu di xurî hun di xurin, ew di xure[…it] ewan di xurin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di xurîm, di xurîn, di xurî, di xurîn. Xurî. Db,dûr :xurûbûm, …bûyn,..bûy,.. bûn,…bû,….bûn. (F) :bi xure, bi xurin. |
| **Xurme** | (n.x.mê) ***fêqî*** Core fêqîyeke bi darên qespan ve di hêt. |
| **Xurmerûn** | (n.l.mê) Xwarineke xurmeyê di rûnî de di qelînin. |
| **Xurnî** | (n.x.mê) Taştê. Têşt. |
| **Xurnîfk** | (n.x.mê) ***tiraş*** Giyayekê tiraşe, bi stirîye, berê wî bi hişkî di hêt hêran û xwarin. |
| **Xurnîk** | (n.x.mê) bn :Xurnîfk. |
| **Xurt** | (hk.x.çewa) Bi hêz. Peyt. Çeleng. :Mirovê xurt. :Hespê xurt. |
| **Xurtbûn** | (k.jn.l.mê) Zîrekbûn. (K) bn : Bûn. |
| **Xurtî** | (n.dar.mê) Zorî. Kotekî. |

| | |
|---|---|
| **Xurtîkirin** | (k.jn.l.mê) Zorî li xelkî kirin. : Ez hîvî ji te di kem xurtîyê li min neke!. (K) bn : Kirin. |
| **Xurtkirin** | (k.jn.l.mê) Bi hêz êxistin. Pê1êxistin. Dijwarkirin : Divê kurd xebata xwe xurt bikin.(K) bn: Kirin. |
| **Xuryan** | (k.jn.x.mê) Xuran. |
| **Xusar** | (n.dar.mê) Texeka sipî ya tenik ji qerîsê, li spêdeyên direnge payîz, yan bihar û zivistana li erd û ser giyayî çê di bit. |
| **Xuşîmank** | (hk.dar.çewa) Zarokê xweşik. Sipehî. |
| **Xuşînk** | (hk.dar.çewa) Sipehî. Rindik. |
| **Xuşk** | (n.x.mê) Xweh. Xwîşk. |
| **Xuşkok** | (hk.dar.çewa) Rind. Ciwan. Xweşik. |
| **Xuşkokbûn** | (k.jn.l.mê) Ciwanbûn.(K) bn: Bûn. |
| **Xuşkokkirin** | (k.jn.l.mê) Ciwankirin. (K) bn: Kirin. |
| **Xuwa** | (n.x) Xudê. Xuda. |
| **Xuya** | (hk.x.çewa) Diyar. Berçav. |
| **Xuyabûn** | (k.jn.l.mê) Diyarbûn. Aşkerabûn. :Eve tu li kû derêyî, çima xuya nabî ?.(K) bn: Bûn. |
| **Xuyakirin** | (k.jn.l.mê) Diyarkirin. Aşkerakirin. :Tu çima xuya na kî?.(K) bn: Kirin. |
| **Xuyanî** | (hk.dar.çewa) Xelkê mirovî bi xwe. Br× Biyanî. |
| **Xû** | (n.x.mê) Sinc. Rewişt. |
| **Xûlî** | (n.x.mê) Xolî. |
| **Xûlîpêwerbûn** | (k.jn.gl.mê) Çamek hatin serê mirovî.Xwelîpêwerbûn. |
| **Xûlîpêwerkirin** | (k.jn.gl.mê) Çam bi serî înan. Xwelîpêwrkirin. |
| **Xûlîser** | (hk.l.çewa) Mirovê berataf. Mirovê derd bi serî hatîn. |
| **Xûn** | (n.x.mê,hk.x.çewa) 1.şileyeke rengê wê sore di nav leşê mirov û giyandaran da heye.2. Gelek bi biha. Gelek giran. |
| **Xûnberdan** | (k.jn.l.mê) Mirov xûnê ji leşê xwe ber di din. (K) bn:Dan. |
| **Xûnkar** | (n.l.dz) Dirinde. Hov. |
| **Xûnmêj** | (karn.l.dz) Kesê xûna xelkî di mêje. Hov. Dirinde. |
| **Xûnmêtin** | (k.jn.l.mê) Xûnê di mêjin. Hovitî. (K) bn: Mêtin. |
| **Xûnrêj** | (karn.l.dz) Hov. Xûnmêj. Dirinde. |
| **Xûnrêjtin** | ,..rêtin(k.jn.l.mê) Mirovên hov xûnê di rêjin. (K) bn: rêtin, rêjtin. |
| **Xûşk** | (n.x.mê) Jin yan keç a heman daybabên mirovî. Xweh. Xuşk. |
| **Xûzî** | (pêrb.alv.xoz) ***rêzman*** Peyveke jibo hîvî û daxazan bikar di hêt.:Xûzî ji xwedê ra ez niha li Kurdistanê bama. |
| **Xûzîka** | (pêrb.alv.xoz) ***rêzman*** Xûzî. |
| **Xwakurk** | (hk.cih, n) Çîyayeke li Kurdistanê. |
| **Xwandin** | (k.jn.x.mê) Mirov nivêsînê di zanit. şiyana kitêb xandinê.xandin. xwendin. Xandin. (K) bdn: ez di xwînim em di xwînîn, tu di xwînî hun di xwînin, ew di xwîne[…it] ewan di xwînin. Pr : dê[bi] + bdn. Bdb : di xwand, di xwandin. Db,dûr: xwandibû,…bûn. (F) : bi xwîne, bi xwînin. |
| **Xwandingeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Xandingeh. |

| | |
|---|---|
| **Xwarin** | (k.jn.x.mê) Dema mirov zadekî di ket di devê xweda bi didanan di hêrit û di çit nava zikî. Zad. (K) bdn: ez di xwem em di xwen, tu di xwey hûn di xwen, ew di xwe[xwet] ewan di xwen. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di xwar[xwer] di xwarin[xwerin]. Db,dûr : xwerbû, ….bûn. (F) : bi xwe, bi xwen. |
| **Xwaringeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Xaringeh. Xurekxane. . :Em sibe li xwaringehê dê firavînê xwen. |
| **Xwarinxane** | (hk.cih,n.dar.mê) Xurekxan |
| **Xwarzî** | (n.x.dn) Xarza. :Kurê, Keça xwîşkê. |
| **Xwastek** | (n.dar.mê) Daxazî. Pêdivî. :Xwastekên me hemû bi cih hatin. |
| **Xwastin** | (k.jn.x.mê) Xastin. Xaztin. Xwestin. :Tu çi di xwazî ?. |
| **Xwastî** | (hk.dar.çewa) Keça hatî xwaztin û di dezgirê da. :Daxazkirî. |
| **Xwazgînî** | (n.dar.pir) Xazgînî. |
| **Xwe** | (cihn) Xo. :Min ji xwe ra tu kar ne kirin. Xwe mezin ne ke !. |
| **Xwebîn** | (hk.l.çewa) Mirovê gelekê bo xwe di danit. Ji xwe piştrast. |
| **Xwecih** | (hk.l.çewa) Mirovê cihek hebe jibo vehewyanê. Akincî. :Ez li Duhokê xwecihim. |
| **Xwecihbûn** | (k.jn.gl.mê) Akincîbûn. Vehewyan. |
| **Xwecihî** | (n.l.mê) Binecihî. :Xwecihbûn. |
| **Xwecihkirin** | (k.jn.gl.mê) Akincîkirin. Binecihkirin. :Deshelatê xelik li akincîgehan xwecihkirin. |
| **Xwedan** | (n.l.dz) Xudan. |
| **Xwedanîn** | (k.jn.l.mê) Xwe kêmkirin. :Ji ya xwe hatin xwar. Nabe em xwedanînan jibo dujminî bi kin. |
| **Xwedayî** | (hk.dar.çewa) Ti1tê yan bûyera bi ferman û heza xwedê rû di dit. |
| **Xwedeçûn** | (k.jn.l.mê) Bêhoşbûn. Jibîrveçûn. :Jiber bêhin a dermanan nexweş bi xwe da çû. (K) :Çûn. |
| **Xwedê** | (n.dar) Xudê. :Xwedê alîkarê me gişka be. :Xwedê zaroyên te bi hêlit. |
| **Xwedênas** | (hk,n.l.dz) Dîndar. Oldar. :Mirovekê xwedênas. |
| **Xwedênenas** | (hk,n.gl.dz) Bêdîn. Bêbawer. |
| **Xwedî** | (n.dar.dz) 1.Xudan.2. Bi. : Xwedî ; namûs, bext, mal, zaro, jin, milk, rez,û htd. |
| **Xwedîbext** | (hk.l.çewa) Mirovê dilpak. Dilsax. Bi bext. Rr×Bêbext. |
| **Xwedîbûn** | (k.jn.l.mê) Xudanbûn. (K) bn : bûn. |
| **Xwedîderkevtin** | (k.jn.gl.mê) Li karekî yan dozekê xwedî derkeve,ang; berpisyarî ya wî liser milên xwe danan. :Divê em li ziman û çanda xwe xwedî derkevin. (K) bn: Derkevtin. |
| **Xwedîkirin** | (k.jn.l.mê) Xudankirin. :Wan ji xwe ra pez xwedî di kirin û me bizin. (K) bn: Kirin. |
| **Xwedîtin** | (k.jn.l.mê) Rolê xwe dîtin. Çewayîya di xwe gehi1tin. : Tu çewa xwe di bînî, dê karî serkeftinê bi dest xwe ve bihînî?. :Xwezî min tucaran weha xwe ne bi dîta. (K) bn : Dîtin. |
| **Xwedînamûs** | (hk.l.çewa) Mirovê xudan rûmet. Bi namûs. Sincdar. |
| **Xwefiroş** | (hk.l.çewa) Mirovê xwe jibo pare û malê di firo1it dujminî. Kirêgirtî. |

| | |
|---|---|
| **Xweger** | (hk.l.çewa) Alavên bi xwe kar di ken. Otumatîk. Demhijmêra xweger. Tirombêla xweger. Çekê xweger. |
| **Xwegirtin** | (k.jn.l.mê) Xwe di ber karî girtin. Berxwedan. Xweragirtin. Liser pêyan rawestan. |
| **Xweh** | (n.x.mê) Xu1k. |
| **Xwehatin** | (k.jn.l.mê) Hi1yarbûn. Hi1 hatin serî. |
| **Xwehebûn** | (hk.l.çewa) Yê gelekê bi xwe di danit û xelkê din tune. Ezî. |
| **Xwekujtin** | (k.jn.l.mê) Dema mirovek xwe di kuje. |
| **Xwekuj** | (hk.l.çewa) Kiryarên xwe kujtinê. |
| **Xwelêkdan** | (k.jn.gl.mê) 1. Bevçûn. 2. Xwe berhevkirin jibo karekî. Xwe peytkirin.: Emê xwe lêk di din dê sube herîn seredanekê. |
| **Xwelî** | (n.x.mê) Arikê bermayî yê sotina daran. Xolî. ***Pend*** :Çav li deran, xwelî ya seran. |
| **Xwelîdank** | (n.dar.mê) Xolîdank. |
| **Xwelîpêwerbûn** | (k.jn.gl.mê) Atafek yan çamek bi serê yekî bi hêt. : Babê wî yê mirî xwelî ya bi serî wer bûy. (K) bn : pêwerbûn, bûn |
| **Xwelîpêwerkirin** | (k.jn.gl.mê) Weke dujminek belayekê bi serê mirovî bi hînit. (K) bn : Kirin. |
| **Xwemalî** | (hk.l.çewa) Xumalî. |
| **Xwenas** | (hk.l.çewa) Ji qinêt.Bi rûmet. Rêzdar. şerim ji xwe kirî. Xwedî malbat. Ji malan. |
| **Xwenasîn** | (k.jn.l.mê) Xwe ji bîr nekirin. Ji rê der ne kevtin. (K) bn: Nasîn. |
| **Xwenaskirin** | (k.jn.gl.mê) Xwenasîn. (K) bn: Kirin. |
| **Xwendegeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Xwandingeh. Xandingeh. |
| **Xwendekar** | (karn,l.dz) Qutabî. |
| **Xwendevan** | (hk.dar.çewan) Mirovê xwendinê di zanit. |
| **Xwendin** | (k.jn.x.mê) Xwandin. Xandin. |
| **Xwendingeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Dibistan. Xandingeh. |
| **Xwendî** | (n.x.dn) Xundî. Xandî. Mêvan. |
| **Xwenenas** | (hk.l.çewa) Xwe ji bîr kirin. Nivşê xwe ji bîr kirin. Xwefirotî. |
| **Xwenîşadan** | (k.jn.l.mê) Dema bireka mirovan di rijin ser cade û kolanan daxaza gihorîn û mafên xwe di kin bi gtin û bilindkirina paroleyan. Îşîkkêşan. |
| **Xweparaztin** | (k.jn.l.mê) Xwe ji derd, bela û karên nerewa dûrxistin. |
| **Xweperest** | (hk.l.çewa) Mirovê her tişt tinê jibo xwe bi vêt. Ezokî. Ezî. |
| **Xwepêşandan** | (k.jn.gl.mê) Xwenîşadan. |
| **Xweragir** | (hk.l.çawa) Xwedî bawerî. Bi hêz. :Pêşmergeh xweragire. |
| **Xweragirtin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov bi karit li nexweşî û deravên teng da hebûna xwe bi parêzit. |
| **Xwere** | (hk.dar.çewa) Mirovê gelek xwarinê di xwe. ***Pend*** :Kereye, xwereye, nekere, dilkesere.ang; mirovê xwe mandî bike, dê berê renca xwe bi xwe. |
| **Xweredîtin** | (k.jn.gl.mê) Wekî mirovî bawerî bi karînên xwe hebe, ko dê 1êt karekî encam bi de. :Ez di xwere di bînin evî kevirî hilgirim. |
| **Xwerist** | (n.l.mê) bn :Xurist. |
| **Xweristî** | (hn.l.çewa) Xuristî. Xwezayî. |

| | |
|---|---|
| **Xweser** | (hk.l.çewa) Mirov yan tiştê ne girêdayî tu kesan. Serbixwe. Xuser. |
| **Xwestek** | (n.dar.mê) Daxaz. Pêdvî. Hezkirin. |
| **Xwestik** | (n.dar.mê) Keça hatî xwestin. Xaztî. Dezgir. |
| **Xwestin** | (k.jn.x.mê) Xazîn. Xaztin. |
| **Xweş** | (hk.x.çewa) Xoş. |
| **Xweşav** | (n.l.mê) bn :Xoşav. |
| **Xweşbîn** | (hk.l.çewa) Geşbîn. |
| **Xweşbûn** | (k.jn.l.mê) Bi tam kevtin. Tenabûn. Lêborîn. Azadkirin. (K) bn : Bûn. |
| **Xweşik** | (hk.dar.çewa) Rindik. Ciwan. Bedew. |
| **Xweşî** | (n.dar.mê) Tenahî. Azadî. Tamxweş. |
| **Xweşkirin** | (k.jn.l.mê) Tenakirin. Ba1kirin. Bi tam êxistin.: Cihê xwe xwe1 ke. :Jîyana xwe xweş kir. |
| **Xweşmêr** | (hk.l.çewa) Mêrçak. Mêrxas. Xoşmêr. Camêr. |
| **Xweşmêrî** | (n.l.mê) Zîrekî. Mêrçakî. Mêranî. :Xwe1mêrîya xwwe li def bêdeshelatan diyar di ke!. |
| **Xweşxweşk** | (n.l.mê) Tiştên xweş. Gotinên xweş. |
| **Xwexwetî** | (n.dar.mê) Xuyatî. |
| **Xweyî** | (n.x.nêr) Xudan. Xwedî. |
| **Xweyîguneh** | (hk.l.çewa) Gunehbar. Gunehkar. |
| **Xweyîhiş** | (hk.l.çewa) Hişyar. |
| **Xweyîkulfet** | (hk.l.çewa) Zelamê bi jin. Mêrê xwedî jin. |
| **Xweza** | (n.l.mê) Xurist.Xwerist. :Xwezayê Kurdistanê gelek ciwane. |
| **Xwezî** | (pêrb) ***rêzman*** Alavê xozîyê. Xozî. ***Pend*** :Bi xwezîyan, na gehî cotê kezîyan. Ang; kez bi niza nagehit armanca xwe. |
| **Xwezîka** | (pêrb) ***rêzman*** Xwezî. |
| **Xwezka** | (pêrb) ***rêzman*** Xwezîka. |
| **Xwê** | (n.x.mê) Toza sipî ya tam a wê swîr, di kin nav xwarinan da. ***Pend*** :Xwekirî xwê d zanin. ***Pend*** :Xwêya xwe di ke nav hmî giraran.ang; mirovê matêker. ***Pend*** :Hemû ti1t bi xwê, xwê jî bi manê(ankoyê).ang; her kar û kiryarê tuxûbê xwe heye. |
| **Xwêdan** | (k.jn.l.mê) 1.Xwedî kewal xwê di din kewalên xwe.2. Rojeka taybete, xwê di din pez û bizinî . (K) bn :Dan. |
| **Xwêdank** | (n.l.mê) Amanek biçûk û hemecore,xwê tê di kin. |
| **Xwêkirin** | (k.jn.l.mê) Xwê bi zadî da kirin jibo tama wî swîr û xweş bi be. |
| **Xwêlîn** | (n.dar.mê) Kanî û cihê mirov xwê jê di derêxin. Kanîya xwê. |
| **Xwêravk** | (n.l.mê) Av û xwê. :Zadê gelek swîr. |
| **Xwêrik** | (n.dar.mê) ***derd*** Derdeke mirovî di gire. |
| **Xwêrî** | (hk.x.çewa) ***dijûn*** Çepeş. Lewçe. |
| **Xwîk** | (n.x.mê) Bac. |
| **Xwîl** | (hk.x.çewa) Xar. Xwar. Xêl. Vîr. |
| **Xwîn** | (n.x.mê) Xûn. şileyê reng sore di le1ê mirov û candaran. ***Pend***:Xwîn na be av. |

| | |
|---|---|
| **Xwînberdan** | (k.jn.l.mê) ***kevneşop*** Mirov xwînê ji candara û mirovan bi lêdana devek tîj li guhan yan cihek dî, jibo çarekirinê ji derdan. (K) bn:Berdan. |
| **Xwînbir** | (karn.l.dn) Pateke xwîna candar û mirovan pê di rawestînin, dema birîdarbûn yan xwîn ji difinan verestinê. |
| **Xwînçûn** | (k.jn.l.mê) Dema xwîn ji birînan di keve. : Xwîna birîndarî gelek ya çûyî, jiber hindê gêj di bit. |
| **Xwîndan** | (k.jn.l.mê) Weke mirov xwîna xwe bi de kesekê xwîna wî kêm û canê wî pêdivî xwînê hebe. |
| **Xwîndar** | (n.dar.dz) Kesê mirovekî di kuje, xwedîyên kujtî wî bi xwîndarê xwe di hijmêrin û di xwazin tola xwe hilînin.Dujmin. Neyar |
| **Xwîndarî** | (n.dar.mê) Dujminî. Neyarî. ***Pend*** :Xwîndarî li beran nekevit.ang; nizayeke jibo mirov ji derdê xwîrîyê dûr bêxit. |
| **Xwînelok** | (hk.dar.çewa) Birîna bi xwîn. Leşê xwîn jê hatî. Le1ê xwînê girtî. : Pêyên min yên xwînelok bûyn çunkî ez pêxas di nav stirîyan da derbaz bûm. |
| **Xwîngerm** | (hk.l.çewa) Mirovê ji dil û viyan karî di ke û liser rijde. Bi gêwil. Çeleng. |
| **Xwînkar** | (n.l.dz) Xwîndar. |
| **Xwînkarî** | (n.dar.mê) Xwîndarî. |
| **Xwînmêj** | (hk.l.çewa) Dirinde. Hov. :Dujminê xwînmêj. |
| **Xwînpendgîn** | (k.jn.l.mê) ***nexweşî*** Derdeke xwîna mirovî di pengit û ji barê xweyê asayî kêm yan pitir di bit. |
| **Xwînrêj** | (hk.l.çewa) Xwînmêj. Hov. Dirinde. |
| **Xwînrêjîn** | (k.jn.l.mê) Rêjtina xwîna ji canê candaran. |
| **Xwînrêjtin** | (k.jn.l.mê) Xwînrêjîn. :Em dijî xwîrêjtinê di westin. |
| **Xwînrijandin** | (k.jn.l.mê) Xwînrêjtin. |
| **Xwînsar** | (hk.l.çewa) 1. Sist û xav. 2. Xwîntal. Sar. Neşirîn. :Cîranê me mirovekê xwînsare. |
| **Xwînşirîn** | (hk.l.çewa) Xweşik. Balkêş. şirîn. :Biçûkê xwîşirîn. |
| **Xwînxwar** | (hk.l.çewa) Xwînmêj. Hov. Dirinde. |
| **Xwîrik** | (n.dar.mê) Kirmeke hirî û bendikan di xwe. |
| **Xwîşk** | (n.x.mê) Xûşk. Xweh. |

# Y

| | |
|---|---|
| **Y** | (ye) Pîta sîhê ya abeya kurdî. |
| **Ya** | 1(pêrb) ***rêzman*** 1.Alaveka bi kar di hêt dema mirov di xazit gotinekê misoger bi ket. :Ya |
| | Eve kê we got !.2. Alava daxwaz û nizayan :Ya xudê tu welatê me ji destên dujminan bi parêzî. |
| **Ya** 2 | (pêrb) ***rêzman*** Alavê hebûna mê. :Ya min. :Ya te. Ev ne ya din. A. Keça wî, mala te. |
| **Yaban** | (hk.cih.cugr,n) Yapan. Japan.Welatê Japonê. |
| **Yabanî** | (malb.n) 1. Xelkê Yabanê. Japonî. 2. Pertal, ziman ên Yaban. |
| **Yad** | (n.x.mê) Bîranîn. |
| **Yadgarî** | (n.dar.mê) Bîrewerî. |
| **Yahê** | (n.x.mê) Supasî. |
| **Yaho** | (n.x.mê) Supasî. |
| **Yadkirin** | (k.jn.l.mê) Saxkirin. Bîranîn. (K) bn :Kirin. |
| **YAK** | (kurt) Yekêtî a Afretên Kurdistanê. |
| **Yan** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveka jibo destnîşankirin yan bijartinê bi viyan yan bi xurtî,bi kar di hêt. : Kurdistan yan neman. :Ev yan ew. ***Pend*** :Naçim aşî, yan dê aşvanî kujim. An. |
| **Yane** | (hk.cih,n.x.mê) Bingeh. Navend. |
| **Yanzdeh** | (hijn.çend) Hijmara 11. Yazdeh. Yazde. |
| **Yanzdehem** | (hijn.çend) Ya,yê, yên yanzdehê. |
| **Yanzdehemîn** | (hijn,rêzkir.çend) Yanzdehemîn. |
| **Yazdehê** | (hijn.rêz) Ya,yê,yên yazdehê. |
| **Yanzdehizar** | (hijn.l.çend) Hijmara 11,000. |
| **Yanzdemilyon** | (hijn.l.çend) Hijmara 11,000,000. |
| **Yapan** | (hk.cih.cug,n) Welatê Japan. |
| **Yapanî** | (nejn.dar.dz) Japanî. |
| **Yar** | (n.x.dz) Dost. Heval. :Yara te. :Yarê wî. :Yara min. :Yara min. Br× Neyar. |
| **Yarê** | (hk,hd.dar.mê) Naznav û gazîkirina keça yar. |
| **Yarî** | (n.x.mê) 1. Werzi3. Lîztik.:Zarok çûn yarîyan. 2. Tirane. Gelte. Henek. |
| **Yarîker** | (karn.dar.dz) 1. Lîztikvan. Werzişvan. 2. Tiraneker. :Mirovê yarîker.ang; tiraneker. |
| **Yarîkirin** | (k.jn.l.mê) 1. Lîztin. :Yarîvanan yarî di kirin. 2.Tiranekirin. (K) bn: Kirin. |
| **Yarîvan** | (karn.dar.dn) Yarîzan. Lîstikvan. |
| **Yarîzan** | (karn.dar.dz) Lîztikvan. |
| **Yarmetî** | (karn.x.mê) Alîkarî. |
| **Yaro** | (hk,hd.dar.nêr) Naznav û gazîkirina mêrê yar. |
| **Yasa** | (n.x.mê) Qanûn. |
| **Yazde** | (hijn.çend) Hijmara 11. |
| **Yazdehem** | (hijn.rêz.çend) Yanzdehem. |

| | |
|---|---|
| **Yazdehemîn** | (hijn.rêz.çend) Yanzdehem. |
| **Yazdê** | ( hijn.çend) Ya/ yê yazdê. Cara yazdê. :Meha yazdê. |
| **Yazdehizar** | (hijn.l.çend) Hijmara 11,000. |
| **Yazdemilyon** | (hijn.l.çend) Hijmara 11,000,000. |
| **Yek** | (hijn.çend) Hijmara 1. Êk. 4-3=1. |
| **Yekanî** | (hk.dar.çewa) Xort yan keça tenê di malê de. Êkane. |
| **Yekbawer** | (hk.l.çewa) Çend mirovên bawerîyê bi karek, kirayarek, dînek, armancekê û htd di hînin. Hevbawer. |
| **Yekbîr** | (hk.l.çewa) Hevbîr. :Ez û tu di boçûnên xwe da yekbîrîn. |
| **Yekbûn** | (k.jn.l.mê) Yekgiritin. Hevgirtin. (K) bn: Bûn. |
| **Yekcan** | (hk.l.çewa) Bi can bi hevre.:Havalînîya ji dil, ji can. |
| **Yekcar** | (hk.l.çend) Demildest.Êkcar. :Carekê, bi carekê |
| **Yekcor** | (hk.l.çend) Corek bi tinê. |
| **Yekdest** | (hk.l.çewa) Bi hevre.Hevgirtî. |
| **Yekdil** | (hk.l.çewa) Bi dil û can bi hevra. |
| **Yeke** | (n.dar.mê) Peyveke girêdayî pîvan, kêşan û hijmartinê ye. :Gez yekeya pîvana dirêjî ye. |
| **Yekem** | (hijn.rêz.çend) Ya, yê, yêd êkê. |
| **Yekemîn** | (hijn.rêz) Êkemîn. |
| **Yekê** 1 | (n.nenas.dar.mê) Êkê. :Jinekê got.ango yekê got. :Bizinekê nanê şivanî xwar. |
| **Yekê** 2 | (hijn.rêz.çend) Ya, yê, yên êkê. :Cara yekê ez hatim, welatî. |
| **Yekêtî** | (n.dar.mê) Êketî. Wekhevî. |
| **Yekgirtin** | (k.jn.l.mê) Hevgirtin. Êkgirtin. (K) bn : Girtin. |
| **Yekgirtî** | (hk.l.çewa) Hevgirtî. |
| **Yekhizar** | (hijn.l.çewa) Êkhizar. Hijmara 1000. |
| **Yekî** | (hk.nenas.nêr) Êkî. Yê yekê. Yekê nediyar. |
| **Yekîtî** | (n.dar.mê) Yekêtî. |
| **Yekkirin** | (k.jn.l.mê) Têkelkirin. Kirin êk. |
| **Yekreng** | (hk.l.çewa) Ji êk reng pêkhatîye. Rengek bi tenê. |
| **Yekrû** | (hk.l.çewa) 1. Wek yek.2. Êkser. |
| **Yeksan** | (hk.dar.çewa) Wekhev. |
| **Yeksanî** | (n.dar.mê) Wekhevî. |
| **Yekser** | (hn.l.çewa) Demildest. Yekcar. Êkser. |
| **Yekûdu** | (n.l.mê) Berahî. Miştûmir. Rêkevtin. Êkûdu. |
| **Yekûdukirin** | (k.jn.gl.mê) Miştûmirkirin. : Berîya em bihên vêrê, me yekûduwa xwe kirîye. |
| **Yekşem** | (hk.dem) Roja êkşembê. |
| **Yekta** | (hk.l.çewa) Tayek. Ketek. Libek. |
| **Yemen** | (hk.cih,cugir.n) Welatek Erebane. |
| **Yemenî** | (nejn) 1. XelkêYemenê. 2. Pertalên ji welatê Yemen. |
| **Yeprax** | (n.x.mê) Îprax. |
| **Yewnan** | (hk.cih,cugirn.nejn)1.Welatê Yewnanistanê.2. Xelkê Yewnanistan. |
| **Yewnanistan** | (hk.cih,cugrn) Welatê Yewnanan. |

| | |
|---|---|
| **Yewnanistanî** | (netwn) bn :Yewnanî. |
| **Yewnanî** | (netew,n)1. Xelik ê Yewnan. 2. Mita, ziman û pertalên ji Yewnanê. |
| **Yezdan** | (n.dar) Xweda. Ezdan. |
| **Yezdanî** | (hk.dar.çewa) Karê xwedayî. |
| **Yê** | (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo tuxmê nêr yan kesek ne diyar bi kar di hêt. :Birayê min. :Yê rawestayî hevalê teye, yan yê rûniştî?. ***Pend***:Yê guh nede mezinan, dê lê hên şaxên bizinan. ***Pend*** :Yê bi lingekî, xera dike gundekî. ***Pend*** :Yê got û kir mêre, yê ne got û kir şêre, yê got û ne kir, kerê nêre. ***Pend*** :Yê neke, na xwe. ***Pend***:Yê ne li şerî, şêre. |
| **Yêx** | (hk.x.çewa) Peyveke bo kewalên lewaz û kêmgoşt, ji nav yên bizinî veder di kin dako bihayê kewalên çak kêm ne be. |
| **Yêxkirin** | (k.jn.l.mê) Cudakirina kewalên yêx. |
| **YNK** | (kutr,n) Partî ya Yekêtîya Nîştimanî a Kurdistan. |
| **Yûro** | (n.cîn.x) €, Diravê çend welatên ewropayî. |

# Z

| | |
|---|---|
| **Z** | (ze) Pîta sih û êkê, û dawîyê ya abeya kurdî. |
| **Za** | (hk.x.çewa) 1.Bergotineke jibo bi hêzkirina gotinan bi kar di hêt. Ma. 2. Zuha. |
| **Zab** | (hk,cih,n.x.mê) Çem. Robar. |
| **Zabûn** | (k.jn.l.mê) bn:Zuhabûn. |
| **Zad** | (n.x.nêr) 1. Xwarin.2. Navek paşpirte bi navan ra .Têjik. Nivş : Mêrzad. Ang; kurê, keça şêran. Begzad, tuxmê(ji malbegan)Perîzad; ang ji perîyan û htd. |
| **Zade** | (paşpir) Nivş. Zad. |
| **Zadxane** | (hk.cih,n.dar.mê) Xwaringeh. Xurekxane. |
| **Zaf** | (kn.x.çewa) Pir. Gelek. Mişe. Zehf. |
| **Zagon** | (n.x.mê) Qanûn. |
| **Zahid** | (hk.x.çewa) Mirovê zad ne xwarî. Mirovê birsî. Mirovê birçî. Girevgirtî. |
| **Zahidkirin** | (k.jn.l.mê) Zad ne xwarin. Girevgirtin. Xwe birçîkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Zak** | (n.x.mê) 1. Mîrê cara yekî piştî candar di zêt. 2. Ger. Dor. Car. : Vî zakî tu li ber çwîngê bi mîne. :Zakê mine, teye, .. û htd. |
| **Zakirin** | (k.jn.l.mê) bn:Zuhakirin. |
| **Zal** | (hk.x.çewa) Serdest. Xurt. |
| **Zalbûn** | (k.jn.l.mê) Miyan. Karîn. Têhelhatin. (K) bn: Bûn. |
| **Zalkirin** | (k.jn.l.mê) Serdestkirin. |
| **Zam** | (n.x.mê) Birîn. Derd. Kul. |
| **Zamdar** | (hn, hk.dar.çewa) Birîndar. Nexweş. Dilkul. |
| **Zamkevtin** | (k.jn.l.mê) Kulbûn yan herişîna masolkên mirovî. |
| **Zan** | (k.jn.x.mê) Giyandarên mê têjikan yan zarokan di kin. Berdewamîya nivşî. : Bizina wan ya zay. Çêlek di zê. |
| **Zana** | (hk,hn.x.çewa) Mirovê şareza. Bispor. ***Pend*** :Zana be pisyarker be. ***Pend*** :Zana aqilî ji nezanan werdigire, û nezan ji zanayî. |
| **Zandor** | (n.dar.mê) Xwendin li ser mijareka taybetî jibo wergitina zanyarîyan. Xol. |
| **Zanebûn** | (hk.çewa, jn) Mirov karekî bi zanîn bi ke. Karê bi pilan. Br× Bêdestî. |
| **Zanist** | (n.dar.mê) Zanîn. |
| **Zanistî** | (hk.dar.çewa) Tiştê girêdayî zanînê. :Bernameyên zanistî. |
| **Zanîn** | (k.jn.x.mê) Zanyarî, salixên zanistî, mîna fîzîk, kîmîk, bîrkarî, candarzanî û htd. Marezabûn di warê cuda de. :Te zanîye dê van rojan ahingeka mezin hêt gêran?. (K) bdn: ez di zanim em dizanîn, tu di zanî hûn di zanin, ew di zane[…it] ewan di zanin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb :di zanî, di zanîn. Db,dûr: zanîbû,zanîbûn. (F): bi zane, bi zanin. |
| **Zanîngeh** | (hk,cih,n.dar.mê) Bingehê xwendina bilind. Zanko. :Zanîngeha Duhok. :Xwîndkarê zanîngehê. |
| **Zanko** | (hk.cih,n.x.mê) Zanîngeh. |

| | |
|---|---|
| **Zanyarî** | (n.dar.mê) Salix. Zanîn. : Te çi zanyarî hene liser rewşa welatî?. |
| **Zar** 1 | (n.x.nêr) Ziman. Devok. :Zarê soranî. Zarê hewramî. Zarê badînî. |
| **Zar** 2 | (hk.x.çewa) ***deng*** Dengê girî û gilîyên zaroyan. Zarzar. |
| **Zar** 3 | (n.x.dn) Zarok. |
| **Zara** | (n.x.mê) Navê keçane. |
| **Zarav** | (n.dar.mê) Peyvên nemaze jibo karek yan tiştekî. Zaravên zanistî. Zaravên toreyî. |
| **Zarezar** | (n.l.mê) 1. ***deng*** Qîjandina zarokan. 2. Lavakirin. |
| **Zarezarkirin** | (k.jn.gl.mê) 1.Qîjandin. 2. Lavakirin. |
| **Zarîn** | (k.jn.x.mê) Zarezarkirin. (K) bdn: ez di zarin em di zarîn, tu di zarî hûn di zarin, ew di zari[...it] ewan di zarin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb: ez di zarîm em di zarîn, tu di zarî hûn di zarin, ew di zarî ewan di zarîn. Db,dûr: ez zarîbûm em zarîbûyn, tu zarîbûy hûn zarîbûn, ew zarîbû ewan zarîbûn. (F): bi zare, bi zarin. |
| **Zaro** | (n.x.dz) Mirovê jîyê wan ji sinêleyî û kêmtir. Piçûk. ***Pend***:Zarokê bê dê(bê dayk) weke çiyayê bê rê .***Pend*** :Zarok fêqîyê zivistanê ye. ***Pend*** :Zarok gula nav malê ye. |
| **Zarokînî** | (n.dar.mê) Qonaxa mirov têda zarok. :Ew bi zarokînî fêrî jenîna amêrên mûzîkê bûye. |
| **Zarotî** | (n.dar.mê) Zarokînî. |
| **Zarveker** | (karn.dar.dn) Mirovê zar xelkî ve di ke. Mirovê pispor di warê honerê zarvekirinê, di şanogerî û filman da. Ekter. |
| **Zarvekirin** | (k.jn.l.mê) Mirov mîna kesekî bi peyvit. Dengê xwe mîna yekî biket. (K) bn: Kirin. |
| **Zarzar** | (n.l.mê) ***deng*** Zarezar. |
| **Zarzarkirin** | (k.jn.gl.mê) Zarezarkirin. |
| **Zava** | (n.x.nêr) 1.Mêrê nû jin anî û şahîya jibo di hêt kirin. :Zelamê jinekê ji malbatekê di hînit, di bite zavayê wan. |
| **Zavabûn** | (k.jn.l.mê) Bûne zava. Dema mêrek di be zava û şahî jêra tê rêxistin.:Kurê wî bû zava.ang; jin jêra anî. |
| **Zavakirin** | (k.jn.l.mê) kirin zava, Weke malbatek bo kurê xwe jinê di hîne,şahî û govendê bo di ken, kurê xwe di ken zava. :Mala xudê ava me kurê xwe kir zava. |
| **Zavatî** | (hk.çewa,n.dar.mê) Heyama mêr têda zava. :Cilikên zavatîyê. |
| **Zax** | (hk.x.çewa) Zîrek. Peyt. Barkirî. Sax. Vejandî.:Mirovê bi zax.ango; mirovê zîrek kêrhatî.:Erdê zax.ang; erdê zibilkirî û law(çak) jibo çandinê.:Pîlên (patirî) zax.ango; jibo karînanê diristin, kar di ken, pirî bargeh. |
| **Zaxbûn** | (k.jn.l.ê) Peytbûn. Pîtbûn. : Zevî bi zibilî zax bû. |
| **Zaxkirin** | (k.jn.l.mê) Bi hêzkirin. Zibilkirin. Barkirin. Bargekirin.Vejandin : Zavî zax kir. :Têlefonê zax di ke. Patirî zax kir. Mejî bi mûzîkê zax kir. (K) bn: Kirin. |
| **Zaxkirî** | (rd.l.çewa) Hatîye zaxkirin. Peyt.:Patirîya tirombêlê ya zakirî ye. |

| | |
|---|---|
| **Zayend** | (n.dar.nêr) ***rêzman*** Nivş. Tuxim. :Zayendê nêr, wek nêrî, hesp, peya, bira û htd, zayendê mêwek ; keç, dayk, bizin, manga, dêhil, bûk û htd, û duzayend; wek gîsk, qutabî, dost, heval, û htd. |
| **Zayîn** | (k.jn.x.mê) Zan. Zêdebûn. : Sala 2005 ya zayînî. |
| **Zayîngeh** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê zana candaran. Cihê bûna zarokan. :Nexweşxaneya zayîn di keve cada xebat. |
| **Zayînxane** | (hk.cih,n.l.mê) Zayîngeh. |
| **Zaza** | (maln.x) Mirov yan zarê zaza. |
| **Zazakî** | (n.dar.mê) Zareke ji zimanê kurdî. Dimilkî. |
| **Zeb** | (hk.x.çewa) Hêzdar. Tund. Qayîm. |
| **Zebale** | (n.dar.mê) Têreke ji qamîşî hatîye diristkirin, derê wê berdaye, Jibo veguhaztina ax û zibilî bo nav bax û rezan li pişta dewaran di kin. |
| **Zebbûn** | (k.jn.l.mê) bn :Zepbûn. |
| **Zebelah** | (hk.dar.çewa) Mirovê gelek kelex mezin û dirêj. :Bi nêre wê henê çi zebelahe li dira henê rawestaye?. Br×Çirkune, girgine. |
| **Zeber** | (hk.x.çewa) Hêzdar. Deshelatdar. Tund. Miyan. |
| **Zeberdest** | (hk.l.çewa) Mirovê hêzdar û bi zend û bask. :Serbest xortekê zeberdeste. |
| **Zebeş** | (n.x.nêr) ***fêqî*** Fêkîyeke, dirêje yan girovire, niva wî sore, tovikên reş di nav dane,tama wî şirîne. Mitî. Zebeş. |
| **Zebir** | (n.x.mê) Zeber. |
| **Zebirdest** | (hk.dar.çewa) bn :Zeberdest. |
| **Zebkirin** | (k.jn.l.mê) bn :Zepkirin. |
| **Zehf** | (hk.x.çewa) Zaf. Pir. :Ez zehf ji te hez di kin. :Hêk li bazarî di zehfin. |
| **Zehfbûn** | (k.jn.l.mê) Pirbûn. Mi3ebûn. :Biyanî li seyrangehên me zehf bûne. |
| **Zehfî** | (n.dar.mê) Berfirehî. Mişeyî. |
| **Zehfkirin** | (k.jn.l.mê) Mişekirin. Berfirehkirin. Zêdekirin. |
| **Zehmet** | (n.x.mê) Giranî. Asteng. Çetin. :Zehmeta min hemû di ber avê da çû!. :Eve karek bi zehmete. |
| **Zehmetbirin** | (k.jn.l.mê) Xwe mandî kirin.Xizmetkirin. : Tu bi xudê çi zehmeta ne be. |
| **Zehmetkêş** | (karn.l.dm) Mirovê xwe jibo karekî zehmet di de. Rêncber. Pale. Karker. |
| **Zehmetkêşan** | (k.jn.l.mê) Dema mirov xwe mandî di ke ji pêxemetî dozekê. |
| **Zehmetkirin** | (k.jn.l.mê) Zehmetbirin. |
| **Zegzege** | (hk.dar.çewa) Zebelah. |
| **Zelal** | (hk.x.çewa) Ron. Aşkera. : Ava kanîyan ya zelale. :Dengê te zelale. ***Pend*** :Wî çi avên zelal ne hêlane !. ang ; mirovê neçak û destdirêj. |
| **Zelalbûn** | (k.jn.l.mê) Ronbûn. E3kerabûn. (K) bn : Bûn. |
| **Zelalî** | (n.dar.mê) Xuyayî. Ronî. Aşkerayî. |
| **Zelalkirin** | (k.jn.l.mê) Ronkirin. Eşkerekirin. :Heger zehmet ne bit waneya me ji me ra zelal bi ke!. (K) bn: Kirin. |

| | |
|---|---|
| **Zelam** | (n.x.nêr) Peya. Mêr. ***Pend*** :Zelamek hebû, çaxê nanê wî hebû, navê wî tunebû, çaxê navê wî hebû, nanê wî tunebû û çaxê herdu hebûn, ew li mal nebû. ***Pend*** :Zelam bi mûyan, jin bi rûyan. |
| **Zelamînî** | (n.dar.mê) Mêranî.Nîşana hêza zelaman. :Çi zelamînî li nik vî kurî nîne!. |
| **Zelate** | (n.x.mê) ***xwarin*** Xwarina ji giyayên ter, yên hûrkirî, mîna kerefs, reşad, xes, xiyar, bacan û htd, digel xwê û tirşî têkel di ken bi zadî ra di xwen. |
| **Zelû** | (n.x.mê) ***candar*** ,***kirmik*** Zêrî. Zêlî. |
| **Zeman** | (hk.dem) Jeman. Dem. Çax. Dan.Danroj. |
| **Zembele** | (n.x.nêr) 1.Mîilê demhijmêran.2. Borîyên avê(henefî). |
| **Zembîl** | (n.x.mê) Seleke ji levenan, zilik, yan şivikan hatî çêkirin. |
| **Zembîlfiroş** | (karn.l.dz) 1.Kesê zembîlan di firoşe.2. Navê dastaneka kurdî ye, ko qehremanê çîrokê zembîl di firotin. |
| **Zemîn** | (n.x.nêr) Erd. |
| **Zend** 1 | (n.x.mê) Qeda destî ji enîşkê tanî destî, yan ji milî ta destî. |
| **Zend** 2 | (malb,n.x) Hozeka kurdî ye. |
| **Zendikbadayî** | (hk.l.çewa) Mirovê zendikên wî bi hêz, peyt û badayî. Xwedî zend û bas. |
| **Zendûbas** | (n.l.pir) Destê mirovî ji mistê(lep) tanî milî. :Zend û bas bi hevre. |
| **Zeng** | (n.x.mê) 1. Amêrekê asinî deng jê di hêt jibo hi3yar û agehdarkirinê bi kar di hêt. : :Zenga malê, demhijmêrê, zenga bi stoyê kewalan ve di ken. Zirzirk. 2. Êke ji du karikên çîroka zeng û bengê. |
| **Zengene** | (malb,n) Hozeka kurdane. |
| **Zengil** | (n.dar.mê) Zeng. Zirzirk. |
| **Zengilandin** | (k.jn.dar.mê) Lêdana zengê. Deng ji zengilê di hêt peydakirin.(K) bdn: ez di zengilînim em di zengilînîn, tu di zengilînî hûn di zengilînin, ew di zengilîne[….it] ewan di zengilînin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb : di zengiland, di zengilandin. Db,dûr: zengilandibû, zengilandibûn. (F): bi zengilîne, bi zengilînin. |
| **Zengillêdan** | (k.jn.gl.mê) Zengilandin. |
| **Zengilok** | (n.dar.mê) ***balinde*** bn :Zengulîk. |
| **Zengilxane** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê hilawîstin yan danana zengilê. |
| **Zengîn** | (hk.dar.çewa) Dewlemend. Heyî. :Mêrê zengîn. :Jina zengîn. :Welatê zengîn. |
| **Zengînbûn** | (k.jn.l.mê) Pere û malê mirovî zehf di be. (K) bn: Bûn. |
| **Zengînî** | (n.dar.mê) Heyînî. Hebûn. : Zengînîya wî ji zîrekîya wî ye. |
| **Zengînkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov bi kar û zanînê xwe dewlemend di ke. (K) bn: Kirin. |
| **Zengulîk** | (n.dar.mê) ***balinde*** Corekê çûçikane. |
| **Zep** | (hk.x.çewa) Tund. Qayîm. Peyt. |
| **Zepbûn** | (k.jn.l.mê) Tundbûn. Ne livîn. :Xwîna birînê bi girêdanê zep na be.(K) bn : Bûn. |
| **Zepkirin** | (k.jn.l.mê) Liser zalbûn. Tundkirin. Ne hi-t bi live. :Xwe zep ke, nexwe dê bi kevî.(K) :bn : Kirin. |
| **Zepkirî** | (hk.l.çewa) Hatî zepkirin. Tundkirî. |

| | |
|---|---|
| **Zepzepe** | (hk.dar.çewa) Zebelah. |
| **Zeqzeqe** | (n.dar.mê) Pivdanka naylonî. Pivdank. |
| **Zer** | (hk.x.çewa) Rengekê taybetî ye. Rengê rojê, rengê mûzê, rengê belgên payîzê. |
| **Zerav** | (n.dar.mêr) ***can*** Kîsikeke di zikê candaran da ye, ava zer têda ye.Zerdav. |
| **Zerbûn** | (k.jn.l.mê) Rengê mirovî jiber nexwe-î yê zer di bit. Belgên daran li payîzê zer di bin. (K) bn : Bûn. |
| **Zerd** | (hk.x.çewa) Zer. |
| **Zerdav** | (n.l.mê) Zerav. |
| **Zerdeşt** | (n.x.nêr) 1. Pêxemberê dînê behdînî(zerde-tî) ye. Pêxemberê kurdan. 2. Navê mêrane. |
| **Zerdil** | (n.dar.mê) ***fêqî*** Mijmije. |
| **Zergul** | (n.l.mê) ***giya*** Corekê genimîye. |
| **Zerik** | (n.dar.mê,hk.çewa) 1. ***nexwe_î*** Derdeke giyan û çavên mirovî zer di ke. 2. Mirovê lewaz û rengê wî zer.3. Zerîya nîva hêkê. Zerika hêkê. |
| **Zerikîn** | (k.jn.dar.mê) Rûçikê mirovî ji egera nexweşî yan tirsê zer di be. (K) bdn: ez di zerikim em di zerikîn, tu di zerikî hûn di zerikin, ew di zerike[….it] ewan di zerikin. PR: dê [bi]+bdn. Bdb : ez di zerikîm, tu, ew, di zerikî, em,hûn, ewan di zerikîn. Db,dûr : ez zerikîbûm, tu zerikîbûy, ew zerikîbû, em zerikîbûyn, hûn, ewan zerikîbûn.(bi bûn). |
| **Zerî** | (n.x.mê) 1. Jina xweşik û xwedî bejin û bal. Xatûn. Perî. Kejal. 2. Rengê zer. : Zerîya dêmê wî ne ji nexwe-îyê ye. |
| **Zerîle** | (n.dar.nêr) ***balinde*** Zerwêle. |
| **Zerîn** | (n.x.mê) ***gul*** 1. Nêrgiza zer.2. Navê keçan. |
| **Zerkêtk** | (n.dar.mê) ***adî*** Core adîyekê firindeye, jehirdare, rengê wî zere, mîna mêşhigivane. |
| **Zerkêzk** | (n.l.mê) bn :Zerkêtk. |
| **Zerkirin** 1 | (k.jn.l.mê) Mirov dîwarekî, kaxetekê, cilekî bi zerî reng bike. (K): Kirin. |
| **Zerkirin** 2 | (k.jn.l.mê) Qelandina giyayên xwarinê di nav rûnî da. :Tolik, kengir, zerkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Zerkirî** 1 | (hk.l.çewa) Rengê zer lê hatî dan. |
| **Zerkirî** 2 | (hk.l.çewa) Qelandî. Sorkirî. |
| **Zerole** | (n.dar.nêr) ***balinde*** bn :Zerwêle. |
| **Zerpêtî** | (hk.l.çewa) ) Mirovê nexwe- ko herdem rengê wî zer û pêtû xuya di ke. |
| **Zerpêtîbûn** | (k.jn.gl.mê) Rengê mirov zer û pêtî di be. |
| **Zerpiçî** | (rd.dar.çewa) Zerpêtî. |
| **Zerpitixî** | (rd.dar.çewa) bn :Zerpêtî. |
| **Zerwêle** | (n.l.dn) ***balinde*** Çûçikeka zer û rengîne,bihar û havînan li Kurdistanê di pirin. |
| **Zerzewat** | (n.dar.pir) ***giya*** Giyayên xwarinê, mîna kerefs, reşad, xes û htd. Teregiya. |
| **Zerzîrî** | (n.x.pdn) ***balinde*** Corekê balindeyane, rengê wan reşe birbir di jîn. |

| | |
|---|---|
| **Zever** | (hk.x.çewa) Wêran. Zîrek. Çavnetirsî. Zeber. |
| **Zeveş** | (n.x.nêr) ***fêqî*** Zebeş. |
| **Zevî** | (n.x.mê) Erdê bi kêr çandinê bi hêt. Zevîya genim, ceh, nok û htd. |
| **Zevlek** | (n.x.pir) Masolk. Zendûbask. |
| **Zevlekdar** | (hk.dar.çewa) Mirovê gir û bi hêz. Xudan zevlek. |
| **Zeyt** | (n.x.mê) Rûnê şil ko ji giya, tov û candaran di hêt çêkirin. |
| **Zeytûn** | (n.x.mê) Berê darzetûnane, şê xir yan hêkîye, rengên kesk, reş, sorê tarî û htd hene paş vegirtinê dindikên wî bi xwarinê ra di hên xwarin û mifa ji zeyta wan di hên wergirtin.. |
| **Zexme** | (n.x.pir) Mîna kulavane jin di xin singa xwe. |
| **Zê** 1 | (n.x.nêr) Çem. Rîbar.Co. |
| **Zê** 2 | (hk.cih,n.x) Du çemin yek zêyê mezin(zêyê behdînan) yê din biçûk li başûrê Kurdistan. |
| **Zêbar** | (hk.cih,dever,n.mê) Devereke li Kurdistana Iraqê. Hozeka kurdane li Kurdistanê. |
| **Zêbarî** | (malb,n. dar) Xelkê devara Zêbar. |
| **Zêç** | (n.x.pir) Zarok. Jin. Xêzan. |
| **Zêde** | (hk.x.çewa) 1. Pir. Mişt. Tijî.2. Ne pêdivî. |
| **Zêdebûn** | (k.jn.l.mê) Pirbûn. Mişebûn. Zehifbûn. :Roj bi pojê endamên navendê zêde di bin. (K) bn : Bûn. |
| **Zêdegavî** | (n.l.mê) Gavên zêde. Karê nerast. Kiryarêd ne rewa |
| **Zêdegavîkirin** | (k.jn.gl.mê) Karên ne rast, rewa kirin. . : Kesê zêdegavîyan bi ke dê hêt sizadan. (K) bn: Kirin. |
| **Zêdekirin** | (k.jn.l.mê) Mi-ekirin. Zehifkirin. :Hukmetê mehyana mamostayan zêde kirin. (K) bn: Kirin. |
| **Zêdeyî** | (n.dar.mê) Mirov,kar yan tiştê zêde.Zêdebûn. |
| **Zêdik** | (malb,n) Hozeka kurdane. |
| **Zêmar** | (n.x.mê) Nalîn. Fîxan. Gîrîn. |
| **Zên** | (n.x.mê) Hizir. Bîr. Zanîn. |
| **Zêndar** | (hk.dar.çewa) Mirovê bîrtîj, ko zû di gotinan di gehit û jibî na ket. Bi zên. :Zîrek qutabîyek pir zêndare, hema carekê di xwînit û waneya xwe tê di gehit. |
| **Zêndî** | (n.x.pir) Mirov,candar û giya. Jiyandar. Nemir. BR×Mirî. |
| **Zêr** | (n.x.nêr) 1. Kanzayekê zere pir bihaye. : Stovanka zêrî, gustîla zêrî.2. Tiştê ciwan û bihadar. |
| **Zêrav** | (n.l.mê) Ava zêrî. |
| **Zêravkirin** | (k.jn.gl.mê) Tamdan bi ava zêrî. :Qayîşa demhijmêrê ya zêran kirî. |
| **Zêravkirî** | (hk.l.çewa) Hatîye zêravkirin. Bi ava zêr tam daye. :Qelemê min zêravkirî ye. |
| **Zêrevan** | (pîşn.dar.dz) 1. Nêrevan. 2. Navê mêrane. |
| **Zêrevanî** | (karn.dar.mê) Çavdêrî. Nêrevanî. |
| **Zêrevanîkirin** | (k.jn.l.mê) Lê nêrîn. (K) bn : Kirin. |
| **Zêrger** | (karn.dar. dz) Kesê karê kirîn û firotina zêrî dike. Zêringir. |

| | |
|---|---|
| **Zêringir** | (kar,n,dar.dz) Zêrgir. |
| **Zêrî** | (n.x.mê) ***candar*** Kirmeke di avêda di jît. |
| **Zêrîn** | (hk.dar.çewa) 1. Tiştê rind û bi biha mîna zêrî. 2. Navê keçan. |
| **Zêrker** | (karn.dar.dn) Zêrger. |
| **Zêrkirin** | (k.jn.l.mê) 1. Çêkirina zêrî. 2. Tamdana kanzadan di zêrî. Bi zêrî tamdan. |
| **Zêrvan** | (karn.dar.dz) Xwedîyê zêran. Zêrker. Zêringir. |
| **Zêval** | . (hk.x.çewa) Çîrikên pateyan. |
| **Zêwe** | (hk.cih,cugrn.x) Navê çendîn gundane li Kurdistanê. |
| **Zêwik** | (hk.cih,cugrn.dar) Navê hinek gundane. |
| **Zibale** | (n.dar.mê) Têra zibilî. Zebale. |
| **Zibare** | (n.x.mê) Karê bi tebayî jibo malekê. Karê bi hevre. |
| **Zibarekirin** | (k.jn.l.mê) Bi karê zibarê rabûn. :Gundî zibarê jibo mala melayî di kin. |
| **Zibil** | (n.x.nêr) Rîx û pişkulên kewal û dewaran. |
| **Zibildan** | (hk.cih,n.dar.mê) Cihê zibilî di kinê. Gîfank. Gîfk. |
| **Zibilîn** | (k.jn.x.mê) Wekî giyandar rêxê di kin. Çêl di zibilit. |
| **Zibilkirin** | (k.jn.l.mê) 1. Jibo zaxkirinê, cotyar zibilî li bax, rez û bîstanan di kin. 2. Zibilîn. (K) bn: Kirin. |
| **Ziç** | (hk.x.çewa) Mit. şir. |
| **Ziçbûn** | (k.jn.l.mê) şirbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Ziçkirin** | (k.jn.l.mê) şirkirin. Çavşorkirin. :Rabe karekî bike, xwe wesa ziç neke. (K) bn: Kirin |
| **Zigurd** | (hk.x.çewa) Zirgurt. |
| **Zik** | (n.x.nêr) ***can***1.Qeda giyanê mirovî ya nerim, navbera ran û singî, ji alê singî. ***Pênd*** :Zikê xwe hînî du nanan meke, canê xwe hînî du karan meke. 2. Cihê xwarin di kevitê. Gede. |
| **Zikçêl** | (hk.l.çewa) Mirovê zikê wî mezin,mîna yê çêlekan. |
| **Zikçûn** | (k.jn.l.mê) Iilbûna desnivêja mirov û candaran ji egera nesaxî yan pîs xwarin û zêde xwarinê. Hinavçûn. (K) bn:Çûn. |
| **Zikêş** | (hk.l.çewa) 1. Mirovê zinx. Mirovê çepel. 2. Janezikî. Êşana zikî. |
| **Zikêşan** | (k.jn.l.mê) Ê-ana zikî. Zik di êşe. (K) bn: Ê-an. |
| **Zikfireh** | (hk.l.çewa) Kesê bêhinfireh. Bêhinfireh. |
| **Zikfirehî** | (n.l.mê) Bêhinfirehî. |
| **Zikîn** | (hk.dar.çewa) Mirovê herdem di xazit zikê xwe pir xwarin bi ket.Bêhnefs. |
| **Zikmakî** | (hk.l.çewa) Nivşî. Berebabî. :Lengerîya wî zikmakî. :Derdên zikmakî. |
| **Zikmeşk** | (hk.l.çewa) Mirovê zikê wî mîna meşkan. |
| **Zikmezin** | (hk.l.çewa) Mirovê zikê wî mzin. |
| **Zikreş** | (hk.l.çewa) Mirovê çavên wî bi xelkê dî na rabin û bi xoşîya wan tengav di bit. Mirovê ne dilsoj. |
| **Zil** 1 | (hk.x.çewa) Mezin. Gewre. Qebe. Biloq. |
| **Zil** 2 | (n.x.nê) Dava giyayê hişk. Zilik. Çeqikê darê yê zirav. |
| **Zilam** | (n.x.nêr) Zelam. Mêr. |

| | |
|---|---|
| **Zilbûn** | (k.jn.l.mê) Zîqbûn. Girbûn. :Çavên wî pêve zil bûn. (K) bn: Bûn. |
| **Zilhêz** | (hn.l.çewa) Xwedî deshelat û hêz. Emerîka welatekê zilhêze. |
| **Zilik** | (n.dar.nêr) Zil.Zilikê şixatê. |
| **Zilînk** | (n.dar.mê) Tiyanka nanî, ji zilikên genim yan ceh hatî çêkirin. |
| **Zilkirin** | (k.jn.l.mê) 1.Zîqkirin. Mezinkirin. Girkirin. 2.Rawestandin. Ne livandin. : (K) bn :Kirin. |
| **Zilpên** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengê kevtina dilopên avê. |
| **Zilq** | (n.x.mê) Zibilê tewalan, çûçikan. :Zilqên sivandokan. |
| **Zilqutandin** | (k.jn.dar.mê) Li hevdana zîhên çavan. Livîna çavan. (K) bdn : ez di zilqutînim em di zilqutînîn, tu di zilqutînî hûn di zilqutînin, ew di zilqutîne[…it] ewan di zilqutînin. Pr : dê [bi]+ bdn. Bdb : di zilqutand, di zilqutandin. Db,dûr: Zilqutandibû,ziqutandibûn. (F) : bi zilqutîne, bi zilqutînin. |
| **Zilok** | (n.x.mê) bn :Zilînk. |
| **Ziman** | (n.x.nêr) 1.Alavê di hev gehiştinê ye.Derbirîne bi gotin yan nivîsîn, jibo ko mirov di hev bigehije. Her netewekî zimanê xwe heye, zimanê kurdan Kurdîye.2. Ezman. ***Pend*** :Ziman heye dermanê malê, ziman heye wêranê malê. |
| **Zimandirêj** | (hk.l.dz.çewa) Ezmandirêj. |
| **Zimanreş** | (hk.n.l.dz.çewa) Ezmanreş. |
| **Zimanpîs** | (hk.l..çewa, n.l.dz) Ezmanpîs. |
| **Zimanvan** | (pîşn.dar. dz) Iareza di warê zimanan da. |
| **Zimanvanî** | (karn.dar.mê) Iarezayî di warê zimanî da. |
| **Zimanzan** | (pîşn.dar.dz) Zimanvan. |
| **Zimanzanî** | (karn.dar.mê) Zimanvanî. |
| **Zimên** | (n.x.mê) ***deng*** Dengek hêdî û zirave hinde caran ji guhêd mirovî di hêt. Ziringên. |
| **Zimpare** | (n.x.mê) Corekê kaxeza zivir e, mirov jibo renîn û hilûkirina dar, ber, kanzad û htd bi kar di hîne. |
| **Zimparekirin** | (k.jn.l.mê) Hilûkirin bi zimpareyê. (K) bn:Kirin. |
| **Zinar** | (nx.nêr) 1. Nizar.2. Navê mêrane. Br× Beroj. |
| **Zinc** | (n.x.mê) Kolê ji qamîşî çêkirî. |
| **Zincîr** | (n.x.mê) 1.Du qeytanên pan yên wekhev dirêj lêvên wan bi didankan rêzkirîne, ev didanke hevdu di girin jibo peytkirin û vekirina cilan bi kar di hên.2. Rêz. 3. Ristika ji xelekan pêkhatî. |
| **Zincîrkirin** | (k.jn.l.mê) 1.Bi zincîran daxistin. 2. Dorpêçkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Zindî** | (hk.x.çewa) Sax. Êkser.: Evro bernameyek pir xweş bi awayek zindî li KTV dê hêt belavkirin. |
| **Zindîbûn** | (k.jn.l.mê) Saxbûn. Vejiyan. |
| **Zindîkirin** | (k.jn.l.mê) Saxkirin. Vejandin. : Hersal em bîranînaşehîdan zindî di kin. |
| **Zingezing** | (n.l.mê) ***deng*** Zingên. |
| **Zingên** | (n.dar.mê) ***deng*** Dengek zirav di kevit guhê mirovî. Ziringên. |
| **Zinx** | (hk.x.çewa) Çepel. Lewçe. |

| | |
|---|---|
| **Zir** 1 | (hk.x.çewa) Nerast. Nedirist. Sexte. |
| **Zir** 2 | (n.x.mê) ***deng*** Dengê zirîna keran. |
| **Zirarî** | (malb,n) Hozeka kurdane. |
| **Zirav** | (hk.x.çewa) Ne stûr. :Bejin azirav |
| **Ziravbûn** | (k.jn.l.mê) Tişt zirav dibe. Bi werzi-ê bejina mirov zirav dibit. ***Pend*** :Di kûderê zirav bû bila di wêderê bi piçe. (K) bn : Bûn. |
| **Ziravî** | (n.x.mê) Yekeya ziravbûnê. Br×Stûrî. |
| **Ziravkirin** | (k.jn.l.ê) Tiştê stûr mirov bi birîn û jê birinê zirav bi kit. (K) bn : Kirin. |
| **Zirbab** | (n.dar.nêr) Zirbav 1. Babê nerast. 2. Mêrê daykê. |
| **Zirbar** | (hk.l.çewa) Zirbehir. |
| **Zirbarbûn** | (k.jn.gl.mê) Zirbehirbûn. |
| **Zirbarî** | (n.l.mê) Zirbehrî. |
| **Zirbarkirin** | (k.jn.gl.mê) Zirbehirkirin. :Ji mal û milkan hat zirbarkirin. |
| **Zirbehir** | (hk.dar.çewa) Bê behir. Par têda tunebûn. |
| **Zirbehirbûn** | (k.jn.gl.mê) Bê behir bûn.(K) bn: Bûn. |
| **Zirbehirkirin** | (k.jn.gl.mê) Jê bê behir kirin. Bê parkirin. :Birayê xwe ji malê zirbehir kir.(K) bn: Kirin. |
| **Zirbehrî** | (n.l.mê) Behir tê nebûn. Bêbehrî. |
| **Zirbira** | (n.dar.nêr) Birayê mirovî, ji daykê yan ji bavê bi tinê. |
| **Zirdayk** | (n.l.mê) Jinbab. Jinbav. |
| **Zire** | (n.x.mê) Lempeya piçûk ya elektirîkên destî. |
| **Zirezir** | (n.l.mê) ***deng*** 1. Dengê zincîr û ristikan. 2. Dengê zirêna keran. |
| **Zirezirkirin** | (k.jn.gl.mê) Dengê zirezirê jê peydabûn. Bihîstina dengê zirezirê. :Ker zirezirê di ke, diyare yê têrî ye!. |
| **Zirên** | (n.dar.mê) ***deng*** 1. Dengê ristik, stovank, zincîr û htd. 2. Dengê zengilan. 3. Dengê zirîna keran. |
| **Zirgurt** | (hk.dar.çewa) Mêrê bêjin. Xortê bi tinê. Bêjin. Bitinê. |
| **Zirgurtî** | (n.dar.mê) Jiyana bi tinêyî. Bêjinî. |
| **Zirî** | (n.x.mê) Cilên ji hesin hatîne çêkirin şervanan li xwe di kirin jibo parastin ji şûr, tîr û riman. |
| **Zirîç** | (n.x.mê) 1.Davên teysokin di nav perokanda, nexasim yên jinan. 2. Dindikên hinarane yên hişikkirî.3. Zibil ê çûçikan. |
| **Zirîn** | (k.jn.x.mê) Dengê kerane. : Ker di zirit, di zirî, di zirin. |
| **Zirîpoş** | (n.l.mê) Mirov yan tiştê bi zirî hatî poşîn. Tank. |
| **Zirîze** | (hk.cih,cugir,n) Gundeke li devera Zaxo. |
| **Zirk** | (n.x.mê) Ava bi xwelîyê hatîye vegirtin, rengê wê zerve di bit, jibo mizeytan bi kar di hêt. |
| **Zirkeç** | (n.x.mê) Nevisî. Keça nevisî. |
| **Zirkêtk** | (n.l.mê) ***adî*** Zerkêsk. Zerkêtk. |
| **Zirkur** | (n.l.nêr) Kurê nevisî. |
| **Zirna** | (n.x.mê) ***mûzîk*** Amêrekê mûzîkêye, bi pifkirina devî lê dixin, dengê wê pir xweş û dilvekere. |
| **Zirnabêj** | (pîşn.l.dz) Zirnavan. |

| | |
|---|---|
| **Zirnavan** | (pîşn.dar.dz) Mirovê zirnayê lê dixe. ***Pend*** :Iahîya zirnevanî be û ew bi xwe lê bixe. |
| **Zirşerim** | (hk.dar.çewa) Bê-erim. :Mirovê zirşerim. |
| **Zirt** | (n.x.mê) Nav li xwedan. |
| **Zirtek** | (hk.dar.çewa) Mirovê bi zirt û gefan di xurit. Belakir. Difinbilind. Ji xwe zêde. Ierxwaz. |
| **Zirtekî** | (n.dar.mê) Zorî. Kûtekî. |
| **Zirtkirin** | (k.jn.l.mê) Dema mirov nav li xwe di de, xwe mêrxaz û zorzan di zanit. Pesinêd ji xwe mezintir dan. (K) bn: Kirin. |
| **Zirto** | (hk.dar.çewa) Zirtek. |
| **Zirtole** | (hk.dar.çewa) Zirtek. |
| **Zirtonek** | (hk.dar.çewa) Zirtek. |
| **Zirxesû** | (n.dar.mê) Jinbaba jina mêrî, yan jinbaba mêrê jinê. |
| **Zirxezûr** | (n.dar.nêr) Zirbavê jin yan mêrê mirovî. |
| **Zirxîtik** | (n.dar.mê) ***kêzik*** Sîsirk |
| **Zirxweh** | (n.dar.mê) Xweha mirovî ji daykê yan bavê bi tenê. |
| **Ziryan** | (k.jn.x.mê) Dema pîstê mirov û candaran jiber xuryan, cilikên zivir,nexweşîyan û htd di zîrikit û xwînelok di bit. (K) bdn: ez di ziryim em di ziryin, tu di ziryî hûn di ziryin, ew di zirye ewan di ziryin(zirin). PR: dê bi ×bdn. Bdb : di zirya, di ziryan. Db,dûr : ziryabûm, ..bûyn, ..bûy, ..bûn. (F) : bi zirye, bi ziryin(bi zirin). |
| **Zirziqanndin** | (k.jn.l.mê) Leqandin. Veleqandin. Hejandin.(K) bdn: ez di zirziqînim em di zirziqînîn, tu di zirziqînî hûn di zirziqînin, ew di zirziqîne[…it] ewan di zirziqînin. PR: dê bi + bdn. Bdb : di zirziqand, di zirziqandin. Db,dûr : zirziqandibû,ziziqandibûn. (F) : bi zirziqîne, bi zirziqînin. |
| **Zirziqîn** | (k.jn.dar.mê) Livîn. Leqîn. Hijyan. Di zirziqim, bi zirziqe, zirziqî, di zirziqin. |
| **Zirzir** | (hk.dar.çewa) ***deng*** Zirên. :Zirzira dengê bazinkan. |
| **Zirzirkirin** | (k.jn.l.mê) 1.Zirtkirin. Dengê xwe kirin. 2. Dengê zirzirê. (K): Kirin. |
| **Zistan** | (hn.dem.n.x.mê) bn :Zivistan. |
| **Zivêl** | (hk.x.çewa) Perçeyên perokan. Pirtên pateyan. |
| **Zivil** | (n.x.nêr) bn :Zibil. |
| **Ziving** | (n.x.mê) Iikeft. Berevez. |
| **Zivir** | (hk.x.çewa) Tiştê ne hilû. : Dîwarê zivir. Destên zivir. |
| **Zivirandin** | (k.jn.dar.mê) 1. Vegerandin. 2. Badan. (K) bdn: ez di zivirînim em di zivirînîn, tu di zivirînî hûn di zivirînin, ew di zivirîne[…it] ewan di zivirînin. Pr: dê[bi]+bdn. Bdb : di zivirand, di zivirandin. Db,dûr: zivirandbû,zivirandibûn. (F) : bi zivirîne, bi zivirînin. |
| **Zivirbûn** | (k.jn.l.mê) Tişt zivir di bit. : Destên wî jiber karkirinê yên zivir bûyn. (K) bn: Bûn. |
| | |
| **Zivirîn** | (k.jn.x.mê) 1. Vegeryan. 2. Li dora xwe zivirîn. ***Pend***:Zivirî dest ji pêyan dirêjtir. Ang; çi bi destê mirovî ve ne hêt. (K) bdn: ez di zivirim em di |

| | |
|---|---|
| | zivirîn, tu di zivirî hûn di zivirin, ew di zivire[….it] ewan di zivirin. Pr: dê [bi]+bdn. Bdb: ez di zivirîm, em di zivirîn, tu,ew di zivirî, hûn,ewan di zivirîn. Db,dûr. Ez zivirûbûm em zivirîbûyn(bûn), tu zivirîbûy hûn, ewan zivirîbû, ew zivirîbû. (F) :bi zivire, bi zivirin. |
| **Zivirkirin** | (k.jn.l.mê) Mirov tiştê hilî zivir bi ke. :Min dastên xwe zivir kirin. (K) bn: Kirin. |
| **Zivistan** | (hk,dem.n.x.mê) Werzê berf û baranê, yê di dû payîzê ra di hêt. ***Pend*** :Zivistana serhejîn çêtire ji ya dûhejîn. Ang; heger li destpêka zivistanê gelek barî dê dawîya wê ya xwe- be. ***Pend***:Agir fêkîyê zivistanê ye.***Pend*** : Zivistanan xwe gîro neke, biharan xwe ter neke. |
| **Zivîrk** | (n.x.mê) ***adî*** Core kêzikeka zere, jehirdar, mîna mê-hingivê ye. |
| **Zivt** | (hk.x.çewa) Zîx. Peyt. Çeleng. |
| **Zivtbûn** | (k.jn.l.mê) Peyt, çeleng, zîrek- bûn. |
| **Zivtî** | (n.x.mê) Peyt. Zîx. |
| **Zivtkirin** | (k.jn.l.mê) Zîrek, çeleng- kirin. |
| **Ziyad** | (hk.x.çewa) Zêde. |
| **Ziyadbûn** | (k.jn.l.mê) Zêde, pir- bûn. |
| **Ziyadî** | (n.dar.mê) Zêdeyî. |
| **Ziyadkirin** | (k.jn.l.mê) Zêdekirin |
| **Ziyan** | (n.x.mê) Karê nebaş. Karê xira. :Karê tu pê hestayî tu mifa nîne, lê ziyane. |
| **Ziyangehandin** | (k.jn.l.mê) Wekî mirov yan tiştêk bi bit egera xirabkirinê, ziyanê bi gehîne. Karekî têk bi de. : Evsale çirçirkê ziyanên mezin gehandine çandinê. (K) bn :Gehandin. |
| **Ziyankirin** | (k.jn.l.mê) Karên xirab kirin. :Pezê şivanî ziyana mala melayî kir. Ang; hat çerandin. |
| **Ziyaret** | (n.x.nêr) Gor. Goristan. |
| **Zî** 1 | (n.x.mê) Xîç. |
| **Zî** 2 | (hk.dem) bn :Zû. |
| **Zîçik** | (n.x.mê) Pên havêtina dewaran.Pehînên dewaran. |
| **Zîçikdanan** | (k.jn.l.mê) Dewar pênan di weşînin,di danin. Zîçikan di danin. :Hespî zîçikek dana xudanê xo. |
| **Zîçikhavêtin** | (k.jn.l.mê) Zîçikdanan. |
| **Zîh** | (n.x.mê) ***can*** Lêvên çavan ko mijîlank liser rêzin.çermê çavan da di poşit. |
| **Zîl** | (n.x.nêr) bn :Zîlik. |
| **Zîlan** | (hk.cih,devern.x.mê) 1. Navê deverekê ye li Kurdistanê. 2. Navê keçane. |
| **Zîlik** | ( n.dar.mê) 1. Tiştê sertîj yên leşê candarên mîna stêng, zerkêtik, mêşhingiv û htd ko berevanî ya xwe ji dujminan pê di kin dema di leşî di çikilînin û jehirê di rêjinê. 2. Dava giyayê ji nû hişîn di be û bi ser axê di keve, hêjî reng sipî ye. Zîlikê tovikên gundoran ji nû bi ser axê kevtîne.3. Tîtilk. |

| | |
|---|---|
| **Zîlikdan** | (k.jn.l.mê) Hişînbûna giya û daran dema zîlikan di de. : Xiyaran zîlikên dayîn. |
| **Zîn** | (n.x.nêr) Corekê kurtanane, kurte û ciwane, bi rîşîk û bendên rengereng xwemlandîye. Rikêb bi herdu alîyan ve heye jibo siwar pêyên xwe lê peyt bi ken. ***Pend*** :Zînê li çêlê kirî. Ang ; heger cilik ji yekî ne hên. |
| **Zîndan** | (hk.cih,n.dar.mê) Girtîgeh. |
| **Zîndanî** | (hk.dar.çewa) Kesê di zîndanê da. Girtî. |
| **Zîndankirin** | (k.jn.l.mê) Xistin nav zîndanê. Girtin. |
| **Zîndankirî** | (hk.l.çewa) Mirovê hatî zîndankirin. Mirovê kevtî di girtîgehê da. |
| **Zîndewer** | (n.dar.nêr) Candar. Canewer. Jiyandar. |
| **Zîndî** | (hk.dar.çewa) bn:Zindî. |
| **Zîndû** | (hk.dar.çewa) Zindî. |
| **Zînkirin** | (k.jn.l.mê) Zîn liser pişta dewaran danan, kirin. Kurtankirin. : Hesp zîn kir. (K) bn : Kirin. |
| **Zînkirî** | (hk.l.çewa) Dewarê zîn lê hatî kirin û peytkirin. ***Pend*** :Zînê li çêlê kirî. |
| **Zîpe** | (n.dar.mê) Heşt rojên sira dijwarin di zivistanê da, ku ji 18 tanî 25 î şiwatê, hember 3 tanî 10 adarê[zayîn]. ***Pend*** :Ez zîpeme zîpedarim, heger bi barim yan nebarim her ya sarim. ***Pend*** :Zîpene zîpedarin, heger bi barin, genim û çalin, heger nebarin, berx û karin. ***Pend*** :Ne bihar berîya zîpene, ne zivistan piştî zîpene. ***Pend*** :Heger li zîpeyî barî, me da rê, heger ne barî, genim li karê.ang ; barîna berf û baranan li zîpeyî jibo çandina genimî pir başe. |
| **Zîpik** | (n.x.mê) 1. Pirsik. 2. Çipik. |
| **Zîq** | (hk.x.çewa) Gir. Mezin. Beloq. Çavên zîq. Çavên zil. |
| **Zîqbûn** | (k.jn.l.mê) Zilbûn. Belbûn.Girbûn. : Çavên wî ji kêfan zîq bûn. (K) bn: Bûn. |
| **Zîqkirin** | (k.jn.l.mê) Belkirin. Zilkirin. Çavên xwe zîqkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Zîqzîqok** | (n.l.mê) Tiştê di biriskit, di teysit. |
| **Zîrek** | (hk,hn.x.çewa) 1. Hoşbend. Peyt. Çeleng. Zîx. Jîr. 2. Navê mêrane. |
| **Zîrekbûn** | (k.jn.l.mê) Peytbûn. Çelengbûn. Jîrbûn. : Mamostayî gote qutabî tuyê zîrek bûyî, çinke tu pitir ji berê di xwînî .(K) bn: Bûn. |
| **Zîrekî** | (n.dar.mê) Çelengî. Peytî. |
| **Zîrekkirin** | (k.jn.l.mê) Peytkirin. Zîxkirin. : Divê tu evsale xwe zîrek bi kî li xwendingehê. (K) bn: Kirin. |
| **Zîrevan** | (hk.dar.çewa) Mirovê hez di ke her tiştî bi zane. Davdoz. |
| **Zîtik** | (n.x.mê) Zîçik. |
| **Zîv** | (n.x.mê) ***kanza*** Core kanzayeke bi bihaye, rengê wî ber bi sipî ve ye, mîna stovank, gustîl, ristik û htd bi kar di hînin. |
| **Zîvar** | (hk.x.çewa) Hejar. Destkurt. |
| **Zîvarî** | (n.dar.mê) Hejarî. |
| **Zîving** | (n.x.mê) bn :Ziving. |
| **Zîvî** | (hk.dar.çewa) 1. Tiştê rengê wî weke zîvî be.2. Cejina borîna25 salan, ya avakirinê yan jinanînê. Cejinazîvî[yobîla zîvî]. |

| | |
|---|---|
| **Zîvker** | (karn.dar.dz) Mirovê zîvî çê dike. |
| **Zîvkirin** | (k.jn.l.mê) 1. Çêkirina zîvî.2. Tamdan bi zîvî. |
| **Zîvkirî** | (hk.l.çewa) Hatî tamdan bi zîvî. Bi zîvî hatî poşîn. |
| **Zîvzîve** | (n.dar.dz) ***candar adî*** Adîyeke gelek pê hene jihirdare. :Zîvzîvey bi destê wî ve da!. |
| **Zîvzîvk** | (n.dar.mê) ***can*** Hestî yê pişta candaran, yê bi girê ji patikê tanî kilkê. :Zîvzîvka pişta mirovî ji çendîn girêyan pêkhatîye. |
| **Zîwan** | (n.x.mê) Giyayên bi ziyan yên di nav genim, ceh, birinc û htd hişîn di bin. |
| **Zîx** | (hk.x.çewa) Zîrek. Peyt. :Kovan lawekê zîxe, li xandingehê. |
| **Zîxbûn** | (k.jn.l.mê) Zîrekbûn. :Kovan ne wek berê yê zîx bûy!. (K) bn: Bûn. |
| **Zîxik** | (n.dar.mê) Tiştê sertîj. : Zîxikên mûyên rihdîna wî yên biser kevtîn. |
| **Zîxî** | (n.dar.mê) Zîrekî. |
| **Zîxkirin** | (k.jn.l.mê) Zîrekkirin. :Xwe zîx ke da ser bi kevî!.(K) bn: Kirin. |
| **Zîz** | (hk.x.çewa) Sil. Tore. Xemgîn. :Jina zîz. :Xortê zîz. |
| **Zîzbûn** | (k.jn.l.mê) Bi silbûn ji mal derkevtin. Silbûn. :Jina wî zîz bû. :Kurik zîz bû.(K) bn: Bûn. |
| **Zîzkirin** | (k.jn.l.mê) Silkirin. (K) bn: Kirin. |
| **Zom** | (hk.cih,n.x.mê) Ciheke li çolî, xelik li havînan kepir û zincan avan di ken lê akincî di bin, jibo çerandina kewalên xwe û bêhinvedanê. |
| **Zor** | (hk.x.çewa,hn.çend ) 1. Kûtek. 2. Pir. Gelek. ***Pend*** :Zora zor jê di çin, kêma kêm jê di çin. |
| **Zoran** | (n.dar.mê) ***yarî*** Core lîstineke, mirov xwe lêk di din kanê kî dê hevdijê xwe li erdî bi dit û ser kevit. Xwelêkdan. |
| **Zoranbaz** | (pîşn.dar.dn) Mirovê rahatî jibo xwelêkdanê.Lîstikvanê xwelêkdanê. |
| **Zoranbazî** | (n.l.mê) Xwe lêk dan. |
| **Zorandin** | (k.jn.x.mê) Yarîya zoranê kirin. Xwelêkdan. (K) bdn: ez di zorînim em di zorînîn, tu di zorînî hûn di zorînin, ew di zorîne[….it] ewan di zorînin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb : di zorand, di zorandin. Db,dûr: zorandibû, zorandibûn. (F): bi zorîne, bi zorînin. |
| **Zordar** | (hk.dar. çewa) Kesê zorîyê dike.Zirtek. |
| **Zordarî** | (n.dar.mê) Kûtekî. Xurtî. |
| **Zordarîkirin** | (k.jn.l.mê) Xurtî li xelik kirin. Kûtekîkirin. |
| **Zordest** | (hk.l.çewa) Zordar. Zilhêz. |
| **Zordestî** | (n.l.mê) Zordarî. Kûtekî. |
| **Zordestîkirin** | (k.jn.gl.mê) Zordarîkirin. Xurtîkirin. |
| **Zorî** | (n.x.mê) 1. Kûtekî. Xurtî.2. Pirînî. Gelekî. |
| **Zorîkirin** | (k.jn.l.mê) Zordarîkirin. |
| **Zorker** | (hk.l.çewa) Zordar. |
| **Zorkerî** | (n.l.mê) Zordarî. |
| **Zorkerîkirin** | (k.jn.l.mê) Zordarîkirin. |
| **Zorzan** | (hk.l.çewa) Mirovê pir zana. Mirovê gelek di zanit. |
| **Zotik** | (n.x.mê) Paşîya candar û mirovan. |

| | |
|---|---|
| **Zov** | (n.x.nêr) ***candar adî*** Zîvzîve. |
| **Zozan** | (hk.cih, n.x.mê) 1. Cihê fênik û dilveker li havînan. ***Pend***:Zozan di xweşin bi koçerî. 2. Navê keçane. |
| **Zuha** | (hk.x.çewa) Tiştê av jê veweryayî. Hişik. Ne ter. Ne şil. ***Pend*** :ji avê derkeft zirp û zuha. |
| **Zuhabûn** | (k.jn.l.mê) Hişikbûn. (K) bn: Bûn. |
| **Zuhakirin** | (k.jn.l.mê) Hişikkirin. Vewerandin : Cilikên xwe li ber agirê kuçkî zuha kirin. (K) bn: Kirin. |
| **Zuhakirî** | (hk.l.çewa) Hatî zuhakirin. |
| **Zuhayî** | (n.dar.mê) Hişkî. |
| **Zurbe** | (n.x.mê) Revde. Bir. :Zurbeyeka guran. Dehban. Berazan. |
| **Zurne** | (n.x.mê) ***mûzîk*** Zirna. |
| **Zuwa** | (hk.x.çewa) Zuha. |
| **Zû** | (hk.den) Berî dema pêdivî.Di dema xweda. Ne direng. : Zû were mal. Zû bi nive. |
| **Zûda** | (hk.dem, dar) Pêşdem. Berî noke. Zû. Ji mêje. :Zûda ew li derveyî welat di mîne. |
| **Zûkirin** | (k.jn.l.mê) Lezkirin. :Zû ke, heger heval dê te hêlin. |
| **Zûrezûr** | (n.l.mê) ***deng*** Zîrezîr. Qîjeqîj. Nizeniz. |
| **Zûrezûrkirin** | (k.jn.gl.mê) Zîrezîkirin.Girîn. Niznizkirin. |
| **Zûrîn** | (n.dar.mê) Girîn. Zarzar. Zarzarkirin. |
| **Zûve** | (hk.dem) Zûda. |
| **Zûxav** | (n.dar.mê) Kêm .Edav. |

# FERHENGA

# UMÎD DEMÎRHAN

# Ferhenga Destî



Umîd Demîrhan

# Ferhenga Destî

# kurdî bi kurdî

# Umîd Demîrhan

# Sewad

# Çapa Duyem: 2007

# A

| | |
|---|---|
| **A a** | tîpa yekemîn a alfabeya kurdî ye; dengdêreke dirêj e, cîderka wê paşderkî ye, di belavbûna wê de dev vekirî ye û asta belavbûna wê nizm e |
| **a** | ravekera nenas a mêzatiyê ye -a din yeke dîtir -a xerab di te de bê çi nexweşiya xerab hebe di laşê te de derkeve |
| **abal** | 1. veger 2. vegeryayî |
| **abal bûn** | vegerîn |
| **aban** | biyan |
| **abanî** | 1. biyanî 2. rehek û sewalên çolê |
| **abegîne** | şûşe, cam |
| **abor** | 1. tiştê ku pê debar tê kirin 2. êwran 3. îqtisad 4. serinc |
| **aborandin** | /diaborîne/ biaborîne/ 1. debar kirin 2. derfeta jiyanê amade kirin 3. îsraf nekirin 4. pê re derbas kirin |
| **aborî** | 1. her tiştê têkildarî debara jîyanê 2. îqtisadî 3. bêîsrafî 4. Derbasî *"aborî bi razanê û zikmizdanê nabe, bi xebat û xwêdanê dibe" |
| **aborînas** | 1. pisporê îqtisadê 2. debarzan |
| **aborînasî** | 1. pisporiya îqtisadê 2. debarzanî |
| **abor kirin** | debara jiyana xwe kirin |
| **abû** | kesê ku tûşî tecawuzê hatiye, hiltirandî, sihirandî |
| **abûr** | 1. şerm û eyb 2. ar û namûs -abûra yekî birin 1. kesek hetikandin 2. dest dirêjî namûsê kirin |
| **abûtî** | rewşa kesê ku tûşî tecawuzê hatiye, hiltirandîtî, sihirandîtî |
| **aciz** | 1. tengezar 2. canbêzar 3. cangiran *"mêvan ji mêvên aciz e, xwediyê malê ji her duyan aciz e" |
| **aciz bûn** | 1. tengezar bûn 2. jê bêzar bûn 3. cangiran bûn |
| **aciz kirin** | 1. tengezar kirin 2. canbêzarî kirin |
| **acizî** | 1. nexweşî 2. tengezarî 3. canbêzarî |
| **acûr** | kevirê kaxetît |
| **acûrfiroş** | bazirganê kevirên kaxetît |
| **acûrfiroşî** | bazirganiya kevirên kaxetît |
| **acûs** | kirêt |

| | |
|---|---|
| **acûsî** | kirêtî |
| **açixî** | 1. gotin û kirina acizker 2. tinazeyên ku xîreta mirovî dişkînin |
| **açixî dan** | 1. bi awayekî acizker axaftin 2. xîreta yekî şikandin |
| **adan** | 1. xwarinên ji şîr 2. xiza û xurek 3. xêr û ber |
| **adanî** | bi xêr û ber |
| **adar** | meha sêyemîn a salnameya zayînî ye *"adar e, mirovî dike dar e" |
| **adav** | 1. îltihab 2. amas |
| **ade** | [I] paqijkirina çandiniyê ji giyayên bêkêr; kax, aşêf -ade kirin: 1. kax kirin 2. dapîtin 3. çiqil kirin -adekirî: zevî, çem an jî baxê ku ji giyayê ziyandar hatiye paqijkirin |
| **ade [II]** | mêrga levenan |
| **adem** | bav û kalê mirovan ê yekemîn |
| **adem û hewa** | dê û bavên mirovahiyê yên yekem |
| **ademîzad** | mirov |
| **ader** | 1. esîlza 2. torin |
| **aderî** | 1. esîlzatî 2. torinî |
| **adetkî** | 1. li gor rayîşa civakê 2. bi rêbaz *"def jî adetkî lê dikeve" |
| **adil** | dadwer |
| **adil bûn** | dadwer bûn |
| **adir** | nexweşiya tayê |
| **adî** | 1. giyandarên biçûk ên jehirdar ên wekî dûpişk û kevjalan 2. dirinde |
| **adodik** | hesinekî devzirav û devtûj ê ku bi destikekê darî ve ye ji bo deranîna kengir û serikên giyayên xwarinê tê bikaranîn; kartûsk |
| **adroyî** | kesê ku bi nexweşiya tayê ketiye |
| **afandin** | /diafîne/biafîne/ 1. aşofandin 2. vepelişandin |
| **aferîde** | 1. afirandî 2. mexlûq 3. çêbûyî |
| **aferîn!** | bijî! |
| **afet** | 1. bobelat 2. karesat |
| **afir** | di tewleyan de cihê ku xwerina sewalan tê de tê danîn *"afirê gamêşan, bû warê qelsemêşan" |
| **afirandin** | /biafirîne/biafirîne/ 1. xuliqandin 2. çêkirin |
| **afirîn** | /diafire/biafire/ 1. çêbûn 2. pêk hatin |

| | |
|---|---|
| **afirandî** | 1. mexlûq 2. sazbûyî |
| **afirîner** | kesê ku çêdike û pêk tîne |
| **afret** | jin, pîrek, kulfet |
| **aftawe** | 1. tawe 2. boçesêlîn 3. misîn |
| **agah** | ageh |
| **agahî** | agehî |
| **ageh** | 1. hay 2. nûçe 3. peyam -pê ve ageh bûn pê ve arxeyîn bûn |
| **ageh bûn** | 1. hişyar bûn 2. hest kirin |
| **agehdar** | 1. xeberdar 2. haydar 3. pêhesiyayî *“dil, agehdarê dil e” |
| **agehdarî** | 1. danezan, îlan 2. daxuyanî 3. mehlûmat 4. salix |
| **agehdar kirin** | 1. pê hesandin 2. xeberdar kirin |
| **agehker** | kesê ku mirovî haydar û hişyar dike |
| **agehî** | 1. zanîna resen 2. xeber 3. danezana ku ji aliyê dezgehên agehdarkirinê ve tên belavkirin |
| **agir** | germiyeke bi reng, hilm û dûkel e, pileya wî bilind e û ji bo şewitandin, tîn û germê tê bikaranîn *"agir bi çiyan dikeve, ter û hişk tevî hev dişewitin" |
| **agir pê xistin** | 1. sotandin 2. şewitandin 3. agir dadan |
| **agir dadan** | /hilkirin/ ar pê xistin |
| **agirber** | çeka ku diteqe |
| **agirbest** | 1. agirkujî 2. destvekişandina ji cengê-agirbest ragihandin: 1. agirkujî daxuyandin 2. çekberdan beyan kirin -agir xistiye pêşa xwe: li fesadî û belayê digere -agir bi erdê keve gurzek pûşê wî jî naşewite: her di ewlehiyê de ye |
| **agirdiz** | 1. pîşo 2. barûd |
| **aheng** | lihevanîn |
| **ahengdar** | lihevhatî |
| **ahengsazî** | karê lihevanînê |
| **aheste** | hêdî |
| **ahên** | /ahînî/ êş û azar |
| **ahû** | 1. xezal 2. ask |
| **aj** | zîl, çêre û bişkuyên ku nû vedidin |
| **ajal** | sewal, heywan |
| **ajaldar** | sexbêrê sewalan |
| **ajalî** | heywanî |

| | |
|---|---|
| **ajalnasî** | zanistên ku pisporiya wan sewal in |
| **ajar** | 1. nifş 2. nesl |
| **ajarnas** | 1. nifşzan 2. nesebzan |
| **ajarnasî** | zanistên ku pisporiya wan şêweyên çêbûna giyaneweran e |
| **ajawe** | 1. hêwirze 2. tedhîş |
| **ajawegêr** | 1. Hêwirzekar 2. tedhîşkar |
| **aj dan** | zîl vedan |
| **ajero** | zîlên çêreyê ên nû |
| **ajinîn** | /diajine/biajine/ 1. êşîn 2. tajan lê ketin |
| **ajneber** | avjen |
| **ajne kirin** | avjenî kirin |
| **ajo** | 1. sedemkarê tevgerê 2. paldêr |
| **ajotin** | /diajo(dajo)/biajo(bajo)/ 1. meşandin 2. bi rê ve birin *"hemû keran, bi darekî majo" |
| **ajokar** | 1. kesê ku diajo 2. pîşekarê ajotinê |
| **ajût** | gazî, bang |
| **ajûtin** | /diajû/biajû/ 1. gazî kirin 2. hawarî xwestin |
| **aîd** | tiştê ku di bin sexbêriya kesekî de ye |
| **akam** | 1. encam 2. netîce |
| **akincî** | 1. niştecihê sabit 2. êwirî 3. hewiyayî *“akinciyê bêrez, şivanê bêpez, peyayê dibêje: ez, ji tiştekî re nabin” |
| **akincî bûn** | 1. bi cih bûn 2. êwirîn 3. hewîn 4. sitirîn |
| **al** | sorgevez |
| **ala** | 1. nîşaneya serxwebûna gelekî; perçem 2. bilind |
| **alagir** | perçemgir |
| **alagoşk** | girêkên goştî yên ku ji ber zekemiyê di qirikê de çêdibin |
| **alakêş** | kese ku perçemê li pêş dikêşe, perçemkêş |
| **alale** | cureyekî gulên sor e |
| **alandin** | /dialîne/bialîne/ 1. pêçandin 2. paçik kirin 3. dorpêç kirin |
| **alandî** | 1. dorpêçkirî 2. pêçandî |
| **alastin** | /dialêse/bialêse/ ziman tê gerandin |
| **alaş** | 1. çiqil 2. kêran |

| | |
|---|---|
| **alaş kirin** | serê banekî bi kêranan ava kirin |
| **alav** | 1. holepît 2. amûr 3. alif |
| **alay** | xwepêşandana di dêlindêzekê de |
| **alayîş** | xwepêşandan |
| **alaz** | 1. armanc 2. degme |
| **alem** | cîhan |
| **alemdar** | cîhangir |
| **alemî** | cîhangiştî |
| **alênc** | çêrandina sewalan a piştî esrê |
| **alêsek** | 1. tasdalêstî 2. silek |
| **alif** | 1. xwarina sewalan 2. bertîl |
| **alif kirin** | 1. xwarina sewalan dayîn 2. bertîl dayîn |
| **alim** | 1. zana 2. pisporê zanistên şerîetê |
| **aliqandin** | /dialiqîne/bialiqîne/ 1. hilawestin 2. daliqandin |
| **aliqîn** | /dialiqe/bialiqe/ 1. banîn 2. bilîn 3. daliqîn |
| **alizandin** | /dializîne/bializîne/ 1. li hev alandin 2. tevlihev û dijwar kirin |
| **alizîn** | /dialize/bialize/ 1. li hev alîn 2. tevlihev û dijwar bûn |
| **alî** | 1. teref 2. tax 3. şax *"li aliyekî şîn e, li aliyê din dawet e" |
| **alîgir** | 1. terefgir 2. tagir 3. palpişt |
| **alîkar** | kesê ku destyariyê ji kesekî din re dike |
| **alîkarî** | destyarî |
| **alîkarî kirin** | 1. li pişt yekî sekinîn 2. jê re destyarî kirin |
| **alîkêş** | 1. takêş 2. bêhevseng 3. nehinkuf |
| **alîn** | /diale/biale/ 1. lê pêçîn 2. tê gerîn 3. bijinîn 4. li dora tiştekî gerîn |
| **alînok** | zeviya nokan |
| **alîsor** | hirmî |
| **almast** | cureyekî kevirên cewahir e |
| **almastî** | cureyekî rengê gulê yî vekirî ye |
| **aloş** | melaq |
| **aloşî** | melaqî |
| **aloz** | 1. tevlihev 2. teqoze |
| **alozî** | 1. tevlihevî 3. teqozetî |

| | |
|---|---|
| **alû** | 1. xidîna diranan 2. sekihîn |
| **alû bûn** | 1. (diran) sekihîn 2. (diran) xidîn |
| **alûçe** | fêkiyeke ku dişibihe gêlasê lê jê mezintir e |
| **alûle [I]** | kolana berteng |
| **alûle [II]** | bêar |
| **alûs** | kaw û kibar |
| **alûsî** | kawî û kibarî |
| **amade** | 1. berhevkirî 2. berdest 3. hazir, eywez |
| **amade bûn** | 1. berhev bûn 2. hazir bûn, eywez bûn |
| **amadekar** | kesê ku berhev û hazir dike |
| **amadekarî** | 1. berhevkarî 2. hazirî, eywezî |
| **amade kirin** | 1. berhev kirin 2. hazir kirin, eywez kirin |
| **amaje** | elamet |
| **amaje kirin** | 1. qise kirin 2. behs kirin 3. qal kirin |
| **aman** | 1. derdan 2. feraq |
| **amandank** | cihê feraqdanînê |
| **amane [I]** | armanca jiyanê |
| **amane [II]** | xwediyê armanceke diyar |
| **amanşo** | feraqşo |
| **amanşoyî** | karê feraqşûştinê |
| **amar** | 1. pisporiya zanistî ya hejmartina daneyan 2. serjimar 3. hesabdarî |
| **amas** | îltihab û kêm |
| **amîn** | Xwedayo tu qebûl bikî! *"axêna amînan, namîne li ser zaliman" |
| **amoj** | 1. perwerde 2. Şîret 3. şêwr |
| **amojgeh** | saziya ku perwerde, şîret û şêwr lê tê dayîn |
| **amojin** | jinap |
| **amojkar** | pisporê perwerde, şîret û şêwrê |
| **amojkarî** | pisporiya perwerde, şîret û şêwrê |
| **amraz** | 1. amûr 2. alav -amraza tawanê: amûra gunehkirinê -amrazên ragihandinê: alavên salixdanê |
| **amûr** | 1. halet 2. melzeme |
| **amûrsaz** | lûlesaz |

| | |
|---|---|
| **amyar** | wasite -amyara servekirî erebeya dorvekirî -amyarên raguhastinê: wasiteyên neqliyatê |
| **an** | ev jî dibe û a din jî dibe. -an azadî, an pakrewanî! : heke huriyet tunebe, mirin çêtir e! -an na : heke wisa nebe |
| **angaşt** | merc û şert |
| **angaşt kirin** | merc kirin |
| **ango** | 1. bi gotineke din 2. yanê |
| **anix** | cureyekî pûngê ye -anixa kûsiyan: cureyekî cehterê ye |
| **anîn** | /diîne(tîne)/bîne/ ji dûriyê ber bi nêzîkiyê ve kêşan -anîn ziman: der birin |
| **anîşk** | enîşk |
| **anor** | 1. xîret 2. şeref -anora yekî şikandin 1. xîreta yekî şikandin 2. şerefa yekî herişandin |
| **ap** | 1. mam, birayê bavê mirovî 2. peyveke rêzdariyê ya ji bo mêrên mezin |
| **apar** | bêjinga ku hûr lê dike |
| **apincî** | potikê çêrmînî yê bipûrt |
| **apore** | 1. matmayî 2. behitî 3. qutifî |
| **aqar** | 1. qad 2. pîvan |
| **aqil** | di mirovan de seheka têgihiştinê; hiş *"heta ku aqilê paşiyê hat, ê pêşiyê çû" |
| **aqilmend** | hişmend |
| **aqilmendî** | hişmendî *"aqilmendî, tim mezinî ye" |
| **aqit** | 1. dims 2. doşav |
| **ar [I]** | encama şewatê; agir *"ar, di qurmên kevn de ye" |
| **ar [II]** | 1. şerm û eyb 2. heya û ifet |
| **araq** | eraq, mey, şerab |
| **arag** | teral, lexer |
| **aram** | 1. bihuzûr 2. tebitî 3. bisebir |
| **arambexş** | aramdêr |
| **aramdêr** | tiştê ku rehetiyê pêk tîne |
| **aramgeh** | 1. warê ku lê huzûr tê dîtin 2. cihê tenahî û aramîyê yê ku bêhtir ji bo gor û goristanan tê bikaranîn |
| **aramî** | 1. îstiqrar 2. asayîş |
| **aramxane** | saziya ku kal û pîrên bêxwedî diêwirîne û wan xwedî dike |
| **aran** | deşta germ |

| | |
|---|---|
| **arandin** | /dairîne/biarîne/ 1. êşandin 2. azar lê kirin 3. niçandin 4. geş kirin |
| **ararot** | xwarina zarokên viringî; epik |
| **araste kirin** | 1. hildan pêşberê 2. lê rast kirin |
| **arastek** | 1. xeml 2. parçeyê ku bedewiyê dide tiştan |
| **arastin** | /diarêse/biarêse/ 1. xemilandin 2. çîç kirin |
| **arastî** | 1. xemilandî 2. çîç |
| **arav** | ava qirêj a piştî şûştinê |
| **aravtin** | /diarêvîne/biarêvîne/ 1. guvaştin 2. ziwa kirin |
| **arayişt** | xeml, zînet |
| **arçen** | cihê ku her du hestiyên erzenê digihîne hev |
| **ard** | zadê hêrandî *"ardê xwe bêjing kir, bêjinga xwe bi dar de kir" |
| **ardelîn** | di aşan de kulfika ku ard tê re dirije |
| **ardik** | 1. ardê ku ber bêjingê maye 2. binemaya darên qutkirî 3. kakilê ku ji giyayê hişk daweşiyaye |
| **ardû** | şewate *"dijminê ardûyê xwe, dostê nanê xwe ye" |
| **ardxavik** | xarineke ku ji run û ardî tê çêkirin û şekir lê tê reşandin |
| **arek** | 1. binema, bermayî, jêmayî 2. kakilê ku ji giyayê hişk daweşiyaye 3. binemaya darên qutkirî |
| **arengî** | soring |
| **arezû** | daxwaza ji dil |
| **arêx** | sing |
| **argind** | cihê ku agir lê dişixule, kûrika êgir |
| **argiştî** | şah, key |
| **argo** | 1. gotina şermê 2. gotina bêaran |
| **argûn** | rengê êgir *"ar dizane, argûn dizane" |
| **argûşk** | girêkên goştî yên ku ji ber çilmasê di qirikê de hêşîn dibin |
| **arihandin** | /diarihîne/ biarihîne/ êşandin |
| **arizî kirin** | milkiyeteke cemawerî li kesên taybet raspartin |
| **arî** | xweliya piştî şewatê |
| **arîk** | 1. tiştê ku bingehekê ava dike 2. ji hun dir ve banê xênî -arîkê dêv esmanê devî |
| **arîle** | mêrê jinanî |

| | |
|---|---|
| **arînk [I]** | cureyekî girînê ye |
| **arînk [II]** | ardê nokan |
| **arînok** | nokên hûrkirî, şikestî an jî hêrandî |
| **arîşe** | 1. pirsgirêk 2. mesele |
| **arîşen** | rewşa derûnî |
| **arjing** | bêjing |
| **arkolk** | amûra ku pê agir tê hildan |
| **armanc** | 1. hedef 2. meqsed, niyêt |
| **arode** | 1. teral 2. jina gerok |
| **arode bûn** | teral bûn |
| **arodetî** | 1. teralî 2. şûmî |
| **arqilîn** | /diarqile/biarqile/ 1. tehisîn, pê şimitîn 2. weşweşîn |
| **arsim** | çilmas, bahor |
| **artêş** | 1. hêza parastina rewa ya gelekî 2. girseya keyskirî |
| **artîşok** | sewzeyek e |
| **arû** | xiyar |
| **arûng** | mişmiş |
| **arvan** | ard, zadê hêrandî *"arvanê salê, di salê de diçe" |
| **arzeba** | bayê demsalê |
| **arxwe** | bûjena ku tê de hêza pêketinê heye |
| **arxweyîn** | 1. bûjena ku xwediyê hêza pêketinê ye 2. kesê bêminet û bêtirs |
| **asan** | 1. hêsa 2. nezexm û xeşîm 3. besît *"kesibî asan e, di şilî û şoyiyan de dest û piyên wan ziwa ne" |
| **asanî** | 1. hêsatî 2. nezexmî, nexeşîmî 3. besîtî |
| **asaw** | 1. amas 2. kêm û îltihab |
| **asayîş** | 1. aramî 2. ewlehî 3. sukûnet |
| **asê** | 1. zexm 2. hevraz 3. cihê destpêneketî |
| **asê bûn** | 1. xitimîn 2. lê banîn 3. pêrgî hatin |
| **asê kirin** | 1. sekinandin, rawestandin 2. vêsihandin 3. mecbûr kirin 4. dadan *"deriyê xwe asê bike, cîranê xwe meke diz" |
| **asê man** | arqilîn, egle bûn *"hindikî bide ber dasê, da ku tu nemînî asê" |
| **asik** | 1. mîde 2. hûr |

| | |
|---|---|
| **asîman** | valahiya ku li fêza erdê ye |
| **asîtan** | 1. hewş, derîzan 2. gom 3. pêşgir |
| **ask** | xezal, ahû |
| **asmîn** | cureyekî gulan e |
| **aso** | cihê ku wekî nîgaşî erd û esman digihêjine hev; ufuq, şefeq |
| **asogeh** | şefeqa dawîn, fecra sadiq |
| **asraq** | arîk |
| **ast** | 1. merhele 2. rade |
| **astan [I]** | gerestêrkek e |
| **astan [II]** | herêm, dever |
| **astar** | 1. betan 2. binmitêl -astar ji rû bihatir bûn: mesref ji nirx zêdetir bûn |
| **asteng** | berbend *"asteng bê derence nabin" |
| **asûde** | 1. aramdar 2. tebitî |
| **asûq** | alava danûstanê |
| **aş [I]** | xwarin, xurek |
| **aş [II]** | amûreka hêranê ya ku bi hêza av, ba, agirî û bi zivirîna du berên girover ên li ser hev dixebite *"aş bi xeyalekî, aşvan bi xeyalekî" |
| **aş [III]** | 1. tebitî 2. sitirî 3. êwirî 4. teliyayî |
| **aş bûn** | 1. tebitîn 2. sitirîn 3. êwirîn 4. telîn |
| **aşêf** | verûtina çêreya bêkêr; kax |
| **aşêf kirin** | kax kirin *"aqil tune kêf dike, pembo tune aşêf dike" |
| **aşik** | 1. mîde, asik 2. hûr |
| **aşiq** | 1. evîndar 2. Dengbêj *"dew li aşiqan nayê" |
| **aşiyan** | cihê lîsvedana çivîkan; hêlîn |
| **aşîna** | nas |
| **aşît** | şepe, renî |
| **aşkart** | 1. îsbat 2. birhan |
| **aşkartin** | /diaşkêre/biaşkêre/ 1. îsbat kirin 2. delîl nîşan dan |
| **aş kirin** | 1. tebitandin 2. sitirandin 3. hewandin 4. êwirandin |
| **aşofandin** | /diaşofîne/biaşofîne/ 1. westandin 2. bizdandin |
| **aşop** | 1. xeyal 2. nîgaş -aşopa zanistî : xeyala ilmî, nîgaşa zanistî |
| **aşopî** | 1. nîgaşî 2. xeyalî |

| | |
|---|---|
| **aşpêj** | xwarinpêj |
| **aştî** | sulh, lihevhatin -aştiya civakî : aramiya di nava gel |
| **aştîperwer** | aştîxwaz |
| **aştîxwaz** | kesê ku li sulhê digere û bi aliyê din re li hev tê |
| **aşûjin** | ta, bend |
| **aşvan** | 1. xwediyê êş 2. kesê ber êş *"aşvanê aşê mîran, bi xulam e" |
| **aşxane** | xwaringeh |
| **atûn** | 1. kils 2. kilsxane |
| **av** | şileyeke bêtahm, bêreng, û bêbêhn e, li gorî amanê teşe digire û kurteya wê ya kîmyayî h2o *"av, bi bêjingê nayê civandin" -av di gunikên wî de wergeriyaye : avik li şekokên wî geriyaye û balix bûye -ava mend : avegenî-ava reş : nexweşiyeke çavan e -ava reş bi çavan de hatin kor bûn, nedîtin -ava spî nexweşiyek e -ava tezî ava sar - av palavtin bi pîneyekî tenik av paqij kirin |
| **ava** | 1. sazbûyî 2. lidar 3. lipiyan *"dergehê ku jinan xera nekiriye, hîna jî ava ye" |
| **ava bûn** | 1. saz bûn 2. çêbûn *"avabûna malan, di destê jinên çê de ye" |
| **avadan** | 1. sazbûyî 2. lidar, lipiyan 3. çêbûyî |
| **avahî** | 1. cihê sazbûyî 2. înşaet 3. bîna *"ava û avahî nav û nandayî" |
| **ava kirin** | 1. saz kirin 2. jenîn 3. çêkirin |
| **avan** | 1. eware 2. bêkêr |
| **avanî [I]** | 1. ewaretî 2. bêkêrî |
| **avanî [II]** | (r) aliyê sazbûnê yê lêkerê |
| **avasaz** | endazyarê avahiyan; mîmar |
| **avasazî** | endazyariya avahiyan; mîmarî |
| **avbijînk** | alava ku ava xurt dibijîne der û dorê |
| **avda** | pirç, mû, pûrt |
| **av dan** | 1. av lê dan vexvarin 2. bi avê têhnî şikandin |
| **avdel** | kesê ku avê li ser zevî û bîstanan belav dike |
| **avderge** | cihoka avê |
| **avdest** | destnimêj -avdest girtin destnimêj girtin |
| **avdestxane** | destşok |
| **avdonk** | ava goştê kelandî |
| **avder** | avîvan |
| **avdew** | çelqemast |

| | |
|---|---|
| **avêtin** | /diavêje/biavêje/ 1. hilfirandin 2. li ba kirin 3. tê werkirin *"bênamûsî avêtine ber kûçikan, kûçikan jî qebûl nekir" -avêtina ber hev 1. devjenî 2. belapêşkarî -avêtina ser êrîşa ji nişkê ve |
| **avgîz** | 1. cûniyê avê 2. çala avê |
| **avik** | tovê nêrtiya mirov û ajalan; menî |
| **avilk** | peqpeqikên biav ên ku ji ber karkirinê an jî rêveçûnê di dest û piyên mirovî de peyde dibin |
| **avis** | sewala ku gon xwariye û têjik di zik de çêbûye *"bila rê be, bila dûr be; bila bihur be, bila kûr be; bila keç be, bila pîr be; bila avis be, bila bi derengî be" |
| **avis bûn** | (ajal) heml girtin/ ber girtin 2. (mirov) canbêzarî bûn |
| **avis kirin** | 1. (ajal) hami le kirin 2. (mirov) canbêzarî kirin |
| **avî** | avdar, biav *"baran, li cihê avî dibare" |
| **avîje** | paqij, pakîze |
| **avîvan** | 1. kesê avê li ber mêvanan digerîne, avder 2. navekî keçan e |
| **avjen** | melevan |
| **avjenî** | melevanî |
| **avjenî kirin** | soberî kirin, melevanî kirin |
| **avkozkî** | rîzîna rehekan ji ber avdana pir |
| **avkozkî bûn** | (rehek) ji ber piravdanê rizîn |
| **avpalêv** | alava palavtina avê |
| **avpîv** | alava pîvandina asta avê |
| **avrêj** | destşok |
| **avşile** | dimis, doşav |
| **avzêm** | kaniya demdemî |
| **avzêr** | ava ku bi zêr ve tê rengdarkirin |
| **avzêr kirin** | ji ava zêr re derbas kirin |
| **avzûng** | xeleqa serê kemberê ya ku pê tê girêdan |
| **awa** | celeb, cure *"ji dê û bavan, dikevin hezar awa" |
| **awan** | fitnebaz, dekbaz |
| **awar** | helew, şirînahî |
| **awarte** | 1. mustesna 2. neasayî |
| **awartin** | /diawêre/biawêre/ 1. bi dûr xistin 2. tuneyî hesibandin |
| **awat** | 1. umîd, hêvî 2. xwestek |

| | |
|---|---|
| **awaz** | deng, sewt |
| **awêne** | 1. neynik 2. Eşkere 3. kifş |
| **awilandin** | /diawilîne/biawilîne/ xapandin |
| **awilîn** | /diawile/biawile/ xapîn |
| **awir** | nêrîn *“ne nanê mazûvanan, awirên wan tê xwarin” |
| **awir tê vedan** | di bin çavan ve lê nihêrtin |
| **ax [I]** | baneşana keserê |
| **ax [II]** | 1. xwelî 2. xak *"ax û avahî, nav û nandayî" |
| **axa** | 1. serekê êlekê 2. torin |
| **axaftin** | /diaxive/biaxive/ 1. xeber dan 2. peyivîn 3. qise kirin 4. qal kirin |
| **axatî** | 1. serokatiya êlekê 2. torinî |
| **axirî** | 1. dawî 2. encama karekî *"axirî, heta derê gorê ye" |
| **axivîn** | /diaxive/biaxive/ 1. (birîn) ji nû ve vejîn 2. terqîn 3. bijiqîn |
| **axîn** | 1. keserkişandin 2. nalîn -axîn kişandin 1. nalîn 2. zûrîn 3. kesirîn |
| **axund** | mela |
| **axze** | alava bihîstok |
| **aya** | gelo |
| **ayende** | pêşeroj, dahatû |
| **ayet** | gotinên Xwedê |
| **ayn** | ayîk *"ayinê bizina kol, ji ya bi qloç re namîne" |
| **ayisandin** | /diayisîne/biayisîne/ 1. pê ve kirin, zeliqandin 2. pê xistin |
| **ayisîn** | /diayise/biayise/ 1. pê ketin 2. pê ve bûn, zeliqîn |
| **ayîk** | 1. heyf 2. mezlûmtî 3. belezûrî |
| **ayîn** | dêlindêza olî |
| **aza [I]** | 1. hur 2. serxwe û xwebûyî 3. mêrxas û egîd 4. çeleng û dilawêr |
| **aza [II]** | 1. her endamekî cendêk 2. endam, namzed *"azayê bitirs, bila qet tunebe" |
| **azad** | 1. ne kole 2. serbixwe 3. hur 4. bêqeyd û bêbend 5. serdanpê bêpeywend |
| **azadî** | 1. serbixwetî 2. huriyet |
| **azadîxwaz** | 1. kesê ku serxwebûne dişopîne 2. Kesê ku mafên xwezayî dixwaze -azan xwendin bangî nimêjê kirin |
| **azan** | ezan |

| | |
|---|---|
| **azar** | 1. renc û dilmayîn 2. şermezarî *"mirovê derdomerdo, bi azara derdan dizane" |
| **azeb** | kesê ku nezewiciye *"azebê malê xwe be, paşê yê xelqê be" |
| **azgîn** | azwer |
| **azî** | 1. nexweşî 2. bêhalî |
| **azî kirin** | 1. nexweş bûn 2. bêhal bûn 3. aciz bûn |
| **azîne** | 1. rêbaz 2. rêpîvan -azîneya axaftinê rêbaza xeberdanê |
| **azmûn** | îmtihan -azmûna jiyanî îmtihana man û nemanê |
| **azmûn bûn** | 1. îmtihan bûn 2. ceribîn 3. di karekî de pijîn |
| **azmûn kirin** | 1. îmtihan kirin 2. ceribandin 3. sergihayî kirin |
| **azwer** | çavçil |
| **azwerî** | çavçilî |

# B

| | |
|---|---|
| **B/b** | tîpa duyemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke lêvkî ye, awayê belavkirina wê girtî û nerm e |
| **ba [I]** | nexweşiya qolinckî |
| **ba [II]** | tevgera hewayê *"agir berda kayê, xwe da ber bayê wê" |
| **-bayê weşt** | cureyekî tevgera hewayê ye |
| **ba li ber guhan ketin** | **-** pê hesîn lêbelê baş tê negihiştin |
| **-ba hatin** | hewa tev gerîn |
| **-ba lê anîn** | 1. firsend jê standin 2. desteser kirin |
| **ba [III]** | hind, cem, nik *"ba comerdekî, hespek û qespek yek in" |
| **ba [IV]** | tir û fis |
| **-ba li ber ketin** | tir an jî fis kirin |
| **babelîç** | tiliya gustîlê |
| **babelîsk** | bayê dijwar û hêzdar ê ku dizivire û ziyanê digihîne dorhêlê |
| **babet** | **1**. mijar 2. mesele 3. Cure |
| **babfile** | **1**. kesê ku bi darê zorê misilman bûye 2. misilmanê ji dê û bavekî kafir |
| **babidest** | kesê ku îflas kiriye; malketî |
| **babidestî** | rewşa îflaskirinê; malketîtî |
| **babir** | berbendên ku tundiya bayî dişkînin |
| **babîsok** | bayê ku lûlekî qulozî esmên dibe |
| **bac** | 1. kamçûr 2. diravê ku ji welatiyan tê wergirtin û ji bo pêşniyarên neteweyî tê mezaxtin; xerac 3. xûgî |
| **-baca** | neyekser xeraca veşartî |
| **-baca** | yekser xeraca eşkere |
| **bacana reş** | sewzeyek e û pijandî tê xwarin |
| **bacana sor** | sewzeyek e û hem pijandî hem jî nepijî tê xwarin |
| **bacgeh** | rêvebiriya bacê |
| **bacgir** | karmendê bacgehê |
| **baçermok** | sewaleke kor a şevê ye; çilîçilî |

| | |
|---|---|
| **baçik** | cixare |
| **bad** | ba |
| **badan/badide/bade 1. Badayî** | tewandin 2. qurifandin 3. Qurçimandin |
| **badayî** | tewandî |
| **bade 1** | . cureyekî vexwarina kiholî ya ku ji tiriyan tê çêkirin û reng wê sor an jî spî ye; mey, şerab 3. piyale |
| **badefiroş** | meyfiroş |
| **badek [I]** | çêreyek e |
| **badek [II]** | alava şidandin û sistkirina mixên badayî *"badeka hesinî, xwe bi xwe pesinî" |
| **badek [III]** | paçikeke kaxezên ku di nav bergekî de tên parastin |
| **badîn 1** | . qedeh 2. Îskan |
| **badok** | di tirimpêlê de destikê ku pê ajotin rasterê dibe |
| **bafe** | baq, deste |
| **-bafe kirin** | 1. baq kirin 2. deste bi deste girêdan |
| **bafik** | behane |
| **bafirok** | pêlîstoka zarokan a ku bi ser bendekî ve dikin û berî hewa didin |
| **bafûn** | bafûr |
| **bafûr** | madenekê ku jê amanên malê û hwd tên çêkirin |
| **bager** | bayê zexm û boş |
| **bagêje** | bayê ku lûlekî quloz dibe, babelîsk |
| **bagird** | bagêje |
| **bagurdan** | bangurdan "banek û bagurdanek" |
| **bah** | şehwet |
| **bahî** | bişehwet |
| **bahol** | derdana ku rêwî kel û melên xwe dikinê |
| **bahor** | zekem, çilmas |
| **bahorî** | zekemî, çilmasî |
| **bahoz [I]** | firtonek |
| **bahoz [II]** | kesê bêqerar |
| **bajar** | şarê ku ji gundan û navçeyan mezintir e *" tu çûyî bajarê yekçavan,  divê tu jî çavekî xwe bigirî" |

| | |
|---|---|
| **bajaravahî** | bernamekirina binyadên bajaran |
| **bajarî** | kesê ku li bajêr dijî ***"bajarî**, li erdê narî" |
| **bajarî bûn** | di şarekî de li gor pîvanên wê jiyîn |
| **bajarok** | bajarê biçûk |
| **bajarsazî** | avasaziya binyadên bajêr |
| **bajen** | baskê ku bi hejîna wî bayekî hênik pêk tê |
| **bajêle** | **1**. newan 2. Axozî |
| **-bajêle bûn** | 1. newan bûn 2. axozî bûn |
| **bakir** | cureyekî civîkan e |
| **bakur** | aliyê jorîn ê her tiştî |
| **bakure** | gopal |
| **bal [I]** | 1. zêhn 2. dîqet 3. Têkilî |
| **-bala** | xwe dayîn lê hûr bûn, baş lê nihêrtin |
| **-bal** | kişandin 1. li serê rawestîn 2. lê miqate bûn |
| **bal [II]** | 1. çeng, per 2. rex, alî |
| **bal [III]** | bejn |
| **bala** | bilind, berz |
| **balaban [I]** | 1. nehs 2. şûm |
| **balaban [II]** | amûreke mûsîqayî ya ku bi pifkirinê tê lêxistin |
| **balaberz** | bejnbilind |
| **balafir** | navgîna hewayî a ku difire; teyare |
| **balafirgeh** | qada firîn û niştina teyareyan |
| **balafirşikên** | çeka ku dijî teyareyên cengê tê bikaranîn |
| **balandin/dibalîne/bibalîne** | lê alandin |
| **balanî** | gizgizîka tayî |
| **balax** | têjika gamêşê |
| **balbas** | zêrevanên zome an jî xîvetgehan |
| **baldar** | **1**. bidîqet 2. bisemt 3. bitevdîr |
| **baldirêj** | bêhnfireh |
| **baldiz** | **1**. cazibedar 2. xemrevîn |

| | |
|---|---|
| **baldizî** | **1**. cazibedarî 2. xemrevînî |
| **bale** | **1**. kêmaqil 2. bodele |
| **balexane** | xanûmanên pirqatî yên pir bilind |
| **balgeh** | **1**. piştek 2. berserî, balîf |
| **balinde** | teyrên dirinde |
| **balindeyên goştxur** | firindeyên girs ên ku xwarina wan goşt e |
| **balix [I]** | cihê ku kewarên mêşhingivan lê tên danîn |
| **balix [II]** | 1. gihiştî 2. berpirsiyarê ber qanûnê |
| **balî** | barê girêdayî |
| **balîf** | balgeh *"serê du meriyên çê, naçe ser balîfekî" |
| **balkêş** | 1. sosret 2. Cazibedar |
| **balkêşname** | nameya ku pêhesandin û hişyarkirinê; îxtarname |
| **balkon** | **1**. eywanka ser banî 2. şanişîn |
| **balor** | merdane, loq |
| **balsivik** | **1**. kesê hay ji xwe heye 2. kesî ku bîra wî xurt e 3. hişyar |
| **balûle** | **1**. bi awayê lûlekî pêçayî 2. hop |
| **balûr** | herş û qelşên ku li ser lêş pêk tên |
| **balyoz** | nûnêrê dûgelekî li nik yeke dîtir; sefîr |
| **balyozxane** | nûnergeha dûgelekî ya li nik yeke dîtir; sefaret |
| **ban** | serê xênî *"banê xênî, bi keviran tenê bilind nabe" |
| **banandin/di banîne/biba nîne** | **1.** hîn kirin 2. nav tê dan |
| **bandev** | **1**. firtoneka berfê 2. kuleka bi ser banê avahiyan ve |
| **bandêr** | makîneyeke ku wekî bangurdanan e pê xişirê rê û kolanan tê tepisandin |
| **bandor** | tesîr, eser |
| **-bandor lê kirin** | lê tesîr kirin, lê eser kirin |
| **bandorker** | tesîrker |
| **bane [I]** | sewala malê ya ku li têjika xwedî derdikeve û ne newan e |
| **bane [II]** | 1. çêregeh 2. zozan |
| **banedar** | xwediyê çeregeh an jî zozanê |

| | |
|---|---|
| **baneşan (r)** | peyvên ku peroşî, şaşwazî û xweziyan nîşan didin |
| **bang 1** | . gazî 2. ezan |
| **-banga meleyê biharê** | zirîna keran |
| **-bang dan** | ezan xwendin |
| **-bang lê kirin** | gazî kirin |
| **bangawazî** | **1**. vexwendina bi deng 2. hawarî |
| **bangeşe** | kar û barê nasandina raman û hilberîne kê |
| **bangêr** | koma mezin *"barana nîsanê, çêtir e ji bangêrek zêrê zerê li meydanê” |
| **bangîn** | 1. sewtsewtok, qîrqîrok 2. awazbilind |
| **bangurdan** | kevirekî dûvdirêjkî û girover ê ku li ser axebanan digerînin da ku baş bitepise hev û ew ban dilop neke *"ji **bangurdên** girantir bi ser çûkê de tu tişşt nayê" |
| **banî** | 1. jor 2. serê xênî 3. rastahiya li serê kêrtekî *"av ji kaniyê û nan ji baniyê" |
| **banîje** | qatê ser banê xênî |
| **banîn/diban e/bibane** | 1. hîn bûn 2. lê hatin 3. lê mukur hatin |
| **bankutik [I]** | mizgînî |
| **bankutik [II]** | bangurdan |
| **banû** | 1. xanim 2. stî |
| **banz dan** | baz dan |
| **banzdok** | berava berteng a ku mirov dikare bi ser re baz de aliyê din |
| **baperik** | perperok |
| **bapêç** | bayê bi berf |
| **bapêş** | zekem, bahor |
| **bapîr** | kalik |
| **bapîv** | amûra ku tevgera hewayê dipîve |
| **baq** | 1. defşe 2. deste 3. çûm 4. gurz *"bi xweziyan, dest nagihê-je baqê keziyan" |
| **baqilk** | 1. cureyekî çêreya ku tovên wê kelandî tên xwarin 2. berên vê çêreyê |
| **bar** | 1. piştgiranî 2. Peywir 3. berpirsî |
| **-barê lokan** | mesûliyeta giran |
| **-barê xwe jê dagirtin** | xwesteka xwe jê hildan |

| | |
|---|---|
| **-bar ji ser xwe avêtin** | berpirsiyariya ku wergirtiye kuta kirin |
| **-bar** | kirin 1. bi pişt kirin2. neqil kirin |
| **baran** | 1. şilî 2. bariş*"gur ji baranê bitirsiya, dê ji xwe re kurk çêkira" |
| **-barana kûsiyan** | barana ronîvro ya di sayiyê de |
| **-barana roviyan** | barana xapînok a ku hey dibare û hey disekine |
| **barandin/dibarîne/bibarîne** | 1. şilî rijandin2. tiştek bi ser de rijandin |
| **baranî** | kinca ku di şiliyê de tê lixwekirin |
| **baravî** | şiloziwa |
| **-baravî bûn** | bi nîvî ziwa bûn |
| **barbir** | wasite, amyar |
| **barbû** | xêr û alîkarî |
| **-barbû dan hev** | destyarî berhev kirin |
| **barçêrmk** | cureyekî firindeyên şevê yên bêçav û bêhestî ne; baçermok |
| **bardan** | derdanê mezin, telîsê fireh *"bardanê biqul, pîneyî nagire" |
| **bare** | 1. başet, mijar 2. car, teql |
| **baregeh** | 1. êwirgeh 2. qerargeh 3. wargeh |
| **barek [I]** | ceşirxane |
| **barek [II]** | qatên valahiya seqayê |
| **bareng** | karistana hilberîna keştiyan |
| **bareş** | bayê rojhilatê |
| **barfisk** | teşkên lingan |
| **barim barim** | lîstikeke zarok û xortan e |
| **barimte** | desteseriya ji ber berdêlekê ve |
| **barimte kirin** | (heta ku berdêla xwastî bê dayîn) desteser kirin |
| **barist** | di cendêk de hêza helandina xwarinan bariş şilahiya ku ji esmên dibare |
| **barîdox** | 1. temtêl 2. werz 3. rewş |
| **barîn/dibare/bibare [I]** | 1. şilî rijîn 2. bariş hatin 3. bi ser de rijîn *"adar e, bibare nebare xedar e" |

| | |
|---|---|
| **barîn/dibare /bibare [II]** | (sewal) qajîn |
| **barkêş** | 1. kesê ku giraniyekê bi pişt dike, hemal 2. sewala ku baran pişt dike |
| **barname** | kaxeza ku naveroka wê di heqê bar û xwediyê wî de agahiyê dide; îrsaliye |
| **barû** | avahiya tot û dirêj a ku ji bo payînê tê avakirin |
| **-barûya naqosê** | di dêran de cihê ku zêngil tê de hildiawêsînin |
| **barûd** | bûjeneke ku jê teqemenî tên çêkirin; pîşo |
| **barxane** | 1. erzaq û pêdiviyên rêwiyan 2. embar |
| **-barxaneya leşkerî** | erzaq û pêdiviyên leşkerî yên ku endamên yekîneyê bi xwe re dibine derveyî leşkergehê |
| **basark** | alava ku hewaya sar diweşîne |
| **basîret** | 1. feraset 2. Aqil û sirafet |
| **bask** | 1. endamê firindeyan ê ku pê perwaz digirin; per 2. çepil, mil *"her teyr bi baskên xwe difire" |
| **-bask şikestin** | bêqudûm man |
| **-bask tune ku pê bifire** | pir kêfxweş bûye û perê wî tune ku hilperike esmanan |
| **basko** | çivîka rûçikandî |
| **-basko kirin** | 1. Kurtisandin 2. rûçikandin |
| **bastêq** | pestîlê ku ji tiriyan tê çêkirin |
| **bastûr** | avahî |
| **baş** | 1. çak 2. qenc 3. Rind 4. delal *"xebera xweş bi cîranan re, faydeya **baş**bi nasan re" |
| **başebaş** | 1. bi rêk û pêk 2. riprast |
| **başî** | 1. çakî 2. qencî 3. rindî 4. delalî |
| **başok** | balindeyek e |
| **başûr** | 1. aliyê jêrîn ê her tiştî 2. di erdnîgariyê de berê derziya qiblenameyê |
| **batirsok** | potikên ku bi bi ser dîwarê bostên ve dikin da ku sewal jê bitirsin û nekevinê; reşe |
| **batî** | hêlik, gun |
| **bav** | 1. mêrê diya mirovî 2. giyanewerê ku ji avika wî giyanewerên din çêdibin*"mala bavê, mala mêran e" |

| | |
|---|---|
| **-bavê bêkesan** | sexbêrê belengazan |
| **-bavê xwe nas nekirin** | 1. şîrheramî kirin 2. Ji bo mesleheta xwe tixûb nas nekirin |
| **bavik** | ecdad |
| **baviksalarî** | erka ku tê de bav bi bandor e; pederşahî |
| **bavmarî** | zirbav |
| **bavtî** | 1. nêrtiya ji bo diya giyaneweran 2. sexbêrî |
| **-bavtî kirin** | 1. ji diyê re nêrtî kirin 2. lê xwedî derketin |
| **bawerî** | 1. îman 2. Ewlehî *"baweriya kurdan, her bi çiyê tê" |
| **-baweriya te bi Xwedê hebe** | Yezdanê dilovan şahid be ku... |
| **bawerî pê anîn** | **-** pê ve ewle bûn |
| **bawer kirin** | 1. îman kirin 2. pê ewle bûn *"agir kete mala derewînan, kesî jê bawer nekir" |
| **bawermend** | kesê îmankirî, misilman |
| **bawesîr** | nexweşiyeke çêrmî ye û bi sedema wê laş her dixwire |
| **baweşandin/ dibaweşîne/ bibaweşîne** | 1. Ber bi ba kirin 2. bajen kirin |
| **baweşînk** | bajen |
| **bawî** | kesê ku qolinceke daîmî di laşê wî de heye |
| **bawîşk** | 1. berxewarî 2. nîşaneyên xewê, palûşk *"sal, mîna bawîşkan derbas dibin" |
| **-bawîşkê xwe anîn** | rewşa xewê lê xuya bûn |
| **bax** | qada dorgirtî ya ji darên fêkiyan pêkhatî *"çi diçe ji bêx diçe, ji baxvên çi diçe?" |
| **baxçe** | 1. baxê biçûk 2. hewşa cihekî |
| **baxçevan** | kesê ku di hewşên malan an jî baxên biçûk de dixebite |
| **baxçevanî** | karê hildan û danîna baxçeyan |
| **baxvan** | kesê ku bi baxê fêkiyan re mijûl dibe |
| **baxvanî** | karê hildan û danîna baxan |
| **baxweşk** | di xaniyan de pergala ku hewaya hundir bi ya derve re diguherîne |

| | |
|---|---|
| **baz [I]** | cureyekî balindeyan e *"qaz, bi refa xwe re baz e" |
| **baz [II]** | masûlkeyên di navbera enîşk û sermilên mirovan de |
| **bazar** | **1**. danûstan, kirîn û firotan 2. sûq *"bi merivê merivan re bazar nabe" |
| **-bazara xwe birîn** | têkiliyên xwe ji hev qut kirin |
| **-(ketin) bazara macîrok û gumgumokê** | mebesta alîkarî an jî dijberiya xwe nîşan dayîn |
| **bazargeh** | sûqa kirîn û firotinê;  erase |
| **bazar kirin** | 1. xêr kirin 2. li ser nirxekî li hev kirin *"hesp tune, alifê bazar dike" |
| **bazbend** | 1. toqeya mile berpirsiyaran a ku peywira wan nîşan dide 2. nivişta mil |
| **baz dan** | 1. revîn 2. Qewz kirin 3. gav kirin 4.  bezîn |
| **Bazgeh** | 1. bihura derbasbûn an jî têketinê ya mirov û giyandaran2. di bajaran de xalên ewlehiyê yên ku ketin û derketinê dipê |
| **bazin** | 1. mildank 2. xeleqa milan 3. qeydik |
| **-bazinê stûyî** | tara stûyî; katar |
| **bazirgan** | kesê ku hem firoşkariyê hem jî kiriyariyê dike; tacir *"didu karwan in, sisê bazirgan in" |
| **bazirganî** | karê kirîn û firotanê; ticaret |
| **-bazirganiya azad** | ticareta bêbac a ku hinarde û hawirde bi awayekî tê de serbest digerin |
| **bazirganiya beste** | - ticareta ku mercên giran li ser hinarde û hawirdeyê hene |
| **bed** | 1. xerab 2. nebaş |
| **bedbext** | bêhuzûr |
| **bedbîn** | kesê ku nîgaşa wî her tim neyînî û nebaş e |
| **beden** | [I] laş |
| **beden** | [II] sûr |
| **-Bedenên Amedê** | sûra dîrokî ya li dora Amedê |
| **bedenparêzî** | perwerdekirina laşan li gor rayîşeke werzîşî û xwarineke diyar |
| **bedestan** | sûqa ku ser û dora wê girtî ye |
| **bedew** | 1. rind, delal 2. zerî *"bedewê çav kil kir, dilê xortan kul kir" |

| | |
|---|---|
| **bedewî** | rindî, delalî *"bedewiya mirovî, ilm û mehrifeta mirovî ye" |
| **bedgeh** | kêrtik |
| **bedil** | kincên xizmetkirî |
| **bedreng** | 1. rengê gewrotankî2. rengê xerab |
| **bedrengî** | 1. gewrotankîtî2. rengxerabî *"her reng rengek e, bedrengî jî rengek e" |
| **bedxwarin** | xwarina dûrî rêbazên tenduristiyê |
| **bedxwaz** | 1. xêrnexwaz2. niyêtxerab beg axayê binemalê an jî hozê |
| **begtî** | serokatiya binemal an jî hozê |
| **beh** | (di zimanê zarokan de) xelasbûyî, qediyayî |
| **-beh bûn** | (di zimanê zarokan de) xelas bûn, qedîn |
| **-beh kirin** | (di zimanê zarokan de) xelas kirin, qedandin |
| **behane** | hincet, mehne*"behaneya tirekan, ardê cehîn e" |
| **behicandin/dibehicîne/bibehicîne** | 1. qehirandin2. ji qehran teqandin |
| **behicîn/dibehice/bibehice** | 1. qehirîn 2. ji kerban teqîn *"çi wext giriya û çi wext behicî?" |
| **behî** | (da ku xelq bên ser xweşiyê li malbatê bikin û nizaya bihiştê ji miriyê wan re bikin) danîna civatan ji aliyê xizmên kesê mirî ve; şînî |
| **behîn/dibehe/beibhe1** | . (ceh û genim) stewîn2. (giyayê werza payîzê) zer bûn *"giya li ser binê xwe hêşîn dibe û li ser binê xwe jî dibehe" |
| **behîv** | cureyekî daran e û ji dendikên wê sûd tê wergirtin |
| **behr [I]** | zerya, derya*"behr, bi devê san pîs nabe" |
| **behr [II]** | par, beş *"dinya bi tiran bûya, dê hemû |
| **behra** | keran bûya" |
| **Behram** | gerestêrk e |
| **behre** | 1. kelk û sûd 2. berjewendî 3. par |
| **behreme** | alava qulkirinê; metqeb |
| **behremend** | 1. xwedî-qabiliyet2. jîr 3. sûdwer behremendî 1. jîritî 2. sûdwerî |
| **behs kirin** | 1. jê xeberdan2. qal kirin |
| **bej** | reşahiya erdê, cihê ku ne avî ye |
| **-hêzên bejahiyê** | koma desteyên ku qada çalakiya wan reşahiya erdê ye |

| | |
|---|---|
| **bejavî** | 1. ajalê ku hem di avê de hem jî li ser zevînê dijî 2. navgîna ku hem di avê de hem jî li ser rûyê erdê tê ajotin |
| **bejî** | tiştên ku têkildarî reşahiyê ne |
| **bejn** | 1. qam 2. bal 3. hindam *"aqil ne li bejnê ye, li serî ye" |
| **-bejn tît e, mal mescîd e** | hem li ser û sîçeyê xwe dinihêre hem jî li rewşa mala xwe |
| **bejnaferî** | bejna ku bi nazdarî dimeşe |
| **bejnbihust** | qamkinik |
| **bekere** | alava ku newayên mûsîqayî tomar û qeyd dike |
| **bel** | 1. kifş 2. lipêş 3. diyar |
| **bela** | 1. qeza 2. qiraskê sêrî 3. karesat *"di her tiştî belayek heye, lê di paşxistinê de gelek bela hene" |
| **-bela xwe kiriye ber dêrî** | ketiye keleha qatilbatilê |
| **belalûk** | fêkiyek e û dişibihe gêlasê lê jê hûriktir e |
| **belam** | 1. lêbelê 2. lê |
| **belapêşkar** | kesê ku bela jê tê |
| **belapêşkarî** | 1. belagerî2. rewşa belagerînê |
| **-belapêşkarî yekî bûn1** | . belaya xwe bi yekî gerandin 2. xwîna xwe kirin stûyê yekî |
| **belaş[I]** | 1. fireh 2. poşe |
| **-belaş bûn** | 1. fireh bûn2. poşe bûn |
| **-belaş kirin** | 1. fireh kirin2. poşe kirin |
| **belaş[II]** | 1. herwe 2. bêdirav |
| **-belaş bûn** | 1. herwe bûn2. bêdirav bûn |
| **-belaş kirin** | 1. herwe kirin 2. bêdirav kirin |
| **belav** | ji hev dûr |
| **belav bûn** | li der û dorê weşîn, ji hev dûr ketin*"av rabû sikir û bend belav bû" |
| **belavker** | 1. kesê ku karê tiştekî parvekirî tîne cih 2. bazirganê ku peywira wî belavkirina bûjenan e |
| **belav kirin** | 1. par ve kirin2. teqsîm kirin "bi kevçiyan da ber hev, bi hesikan ve belav kir" |
| **belavok** | daxuyaniya nivîskî ya ku bi destan tê radestkirin |
| **belawela** | tartarî, tarovaro*"hêştir belawela diçêrin, lê guhê wan li ser hev e" |

| | |
|---|---|
| **belawela bûn** | 1. tarovaro bûn 2. kambax bûn3. wêran bûn |
| **belawela kirin** | 1. tarovaro kirin 2. kambax kirin 3. wêran kirin |
| **belbele** | hêwirze û sûresata dengan |
| **belç** | pelên daran *"ba neyê, belç nalivin" |
| **belçim** | belç |
| **belçik** | belçimên hûrik |
| **belbelîtank** | perperok, kerkene |
| **bel bûn** | 1. bi awayekî diyar tijî bûn 2. vît bûn*"bila zikê melayî bel |
| **be** | , bila giya û pel be" |
| **beleban** | 1. zinar 2. şûm |
| **beled** | 1. zana 2. pispor*"beledê malê ne biyan e, kesê ji gund e" |
| **beledî[I]** | berq û birûsk |
| **beledî [II]** | 1. zanatî 2. pisporî |
| **belek** | 1. deqdeqî, xalxalî2. rengrengî |
| **belekî** | rengrengîtî *"belekiya sewalan li derve ye, ya mirovan di hundir de ye" |
| **-belekiya biharê** | destpêka zîlvedana hêşînahiyê |
| **belekon** | şaneşîn |
| **belem** | navgîneke avî yeû dişibihe kelekan |
| **belemvan** | xwedî an jî ajovanê belemê |
| **belengaz** | 1. feqîr, xizan2. bêkes *"wexta ku ji malxweyê malê re gotin“kalê”, dibe belengazê salê" |
| **belenî** | soz û qerar |
| **belenîdar** | sozdayî |
| **belezûrî bûn** | dua û lavayî kirin |
| **belê** | bersiva pejirandinê; erê |
| **belg** | 1. perên kesik ên ku bi dar û giyan ve şîn tên; belç 2. pel *"belgê darê, darê dixemilîne" |
| **-belg dan** | (dar û giya) perên kesik pê ve şîn bûn |
| **belgefîlm** | 1. fîlmên mehlûmatî2. rêzefîlmên agehdarîkirinê |
| **belgename** | destûrname |

| | |
|---|---|
| **belifandin/di belifîne/ bibelifîne** | xapandin |
| **belik** | (di zimanê zarokan de) mûzî, kîr |
| **belikandin/di belikîne/ bibelikîne** | 1. benc kirin2. ji ser hiş birin |
| **beloq** | 1. bel 2. zoq 3. bijiqî |
| **belor** | derdanka ji camê |
| **belqitandin/ dibelqitîne/b ibelqitîne** | 1. dehirandin2. cehimandin 3. qewirandin |
| **belqitiyê!** | nemayê! |
| **belqitiyo!** | nemayo! |
| **belqitîn/dibe lqite/bibelqit e1** | . dehirîn 2. cehimîn 3. qewirîn |
| **belxem** | tifa hişk a ku dişibihe xilîtê |
| **belweşîn** | nexweşiya cuzamê |
| **ben** | ta |
| **benav** | cureyekî daran e |
| **benc** | 1. cureyekî daran e2. bûjenê ku ji vê darê tê bidestxistin û sermestker e 3. bûjena ku lêş bêhest dike |
| **benc kirin** | 1. belikandin2. (berî nişterkirinê) laş bi bencê tevizandin |
| **bend** | 1. ta 2. asteng 3. beş 4. rêje |
| **-benda hilbijartinê** | rêjeya ku divê di hilbijartinê de bê bidest-xistin |
| **-bendê dû şûjinê** | salixgerê xelqê |
| **-benda heyderî** | xişrên bi ser kofiyê ve |
| **bendav** | ava ku peşî lê hatiye girtin |
| **bende** | kole, evd |
| **bendegan** | pêgirtî |
| **bendeganî** | pêgirtîtî |

| | |
|---|---|
| **bende man** | li hêviyê sekinîn |
| **bender** | di qeraxa deryayê de rawestgaha keştiyan |
| **bendewar** | 1. hevîdar 2. dildar |
| **bendik** | (r) xêzeka li nava du peyvan an kîteyan; (-) |
| **bendî** | 1. girtî 2. dîl 3. girêdayî |
| **-(xwe) li bendî tiştekî girtin** | li pey tiştekî şop gerandin |
| **bendîname** | fermana girtina kesekî; tewqîf |
| **bendîxane** | zindan, hebisxane |
| **bendname** | girêdan |
| **bengî** | 1. aşiq 2. Mubtela 3. sewdaser |
| **benî[I]** | goştê hişkirî yê ku kakilê gûzan jî dikine navê |
| **benî [II]** | kole |
| **benîşt** | şîreya ku ji nebatan hildidin û tê cûtinê*"karkeran kar kir, xeraban benîşt cût" |
| **benîzava** | zavayê ku di nav xezûrgelanê xwe de dijî |
| **benz** | reng |
| **-benz avêtin** | reng lê çûn |
| **beq** | cureyekî ajalên avî ye*"beqê çav da çêlekê, zikê wê teqiya" |
| **-beq xesandin** | satore satore gerîn |
| **ber[I]** | 1. pêş 2. pêşî*"tirs, berê mirinê nagire" |
| **-berî zayînê** | beriya mîlada Îsa eleyhiselam |
| **-berê xwe dan** | 1. lê averê bûn 2. nihêrîn |
| **-berê gotinê guhertin** | mijara axaftinê guheztin |
| **ber [II]** | kevir *"ber, ji bestan xilas nabin" |
| **ber [III]** | hingil, guhan |
| **ber [IV]** | adan |
| **ber [V]** | salên temenê sewalan |
| **-duberî û sêberî** | dusale û sêsale |

| | |
|---|---|
| **ber [VI]** | miqdara firehiyê |
| **-duber û sêber** | bi qasî du car û sê caran zêdetir fireh |
| **ber [VII]** | 1. berik, ferşik2. lihêf *"lingê gerê, nayê bin berê" |
| **ber [VIII]** | 1. gon 2. meya, havên 3. tov |
| **-ber girtin** | 1. avis bûn2. mêwe girtin 3. tov girtin |
| **berafî** | nîqaşa der heqê gelemşeyekê de |
| **berafî kirin** | (ji bo çareserkirinê) nîqaş kirin |
| **beraftin/diberêfe/biberêfe** | şîrove kirin |
| **beragî** | berên nûhildayî |
| **berahî** | qeysa ji aliyê firehiyê ve *"avabûna gundan, ji berahiya riyan ve kifş e" |
| **beramber** | 1. tev 2. dij3. deng 4. di gel |
| **-beramberî vê** | 1. tevî vê2. diji vê 3. dengî vê4. digel vê |
| **beran** | hevserê mihê*"berxên xelqê, ji merivan re nabin beran" |
| **-beranê bisko** | 1. beranê tovê 2. malê delaliyê 3. torinê êlê *"beranê bisko bûya, dê li nav pezê bavê bûya" |
| **-beranê şeran** | xurtê cengê |
| **-beran xwarin** | (ji bo mihê) pel û fehl xwarin |
| **beranek** | tiliya mezin |
| **beranberdan** | dema serbestbûna têkiliya zayendî ji bo beranan |
| **berarî** | bexş û alîkarî |
| **-berarî dan** | bexşîş û alîkariya diravan dan hinekan |
| **berate** | 1. goştê genî 2. elamet 3. nîşane |
| **berav** | 1. roja cilşûştinê2. dema kelîşoyê |
| **ber avêtin** | 1. berwext zayîn, hê di pêş de bi cenîneke nivîşkan an jî mirî ve zayîn 2. berwext tev gerîn |
| **beravêtî** | 1. sewala ku têjika wê ji ber çûye 2. kesê ku berwext tev digere |
| **-çalakiya beravêtî** | karê ku di dema xwe de neqewimiye |

| | |
|---|---|
| **beraz** | xinzîr |
| **beraze** | perwaneyên berêş |
| **berbajar** | nava bajêr |
| **berban** | şanişîn |
| **berbang** | aso, berbeyan |
| **-berbanga sibehê** | ronahiya berî şefeqê |
| **berbaz** | di artêşê de payeya di bin serbaziyê re |
| **berbejn** | 1. nivişta stûyan2. hemayîl |
| **berbend** | karê ku kirina wî qedexe ye |
| **berbend bûn** | derî li ber hatin girtin |
| **berbendî** | 1. qedexe 2. asteng *”diz xwemal e, berbend betal e” |
| **berbend kirin** | qedexe kirin |
| **berber[I]** | 1. dij 2. reqîb |
| **berber [II]** | kesê ku por û rihan dikurtisîne û tiraş dike |
| **berberî [I]** | 1. neyartî 2. dijminatî |
| **berberî [II]** | pîşeyê kurtisandin û kurkirina por û rihan |
| **berbes** | wizeya ku di xwarinan de heye |
| **berbiba** | 1. cihê ku ba jê digire 2. cihê ku xewle ye û teşqele jê tên *"guhera dawiyê, berbiba ye" |
| **berbiçav** | 1. dîtî û bînayî2. eşkere û diyar |
| **berbisk** | toqeya porê jinan |
| **berbî** | berbûk *"bêder bi bê, bûk bi berbiyê” |
| **berbûk** | jina ku bi bûkê re mijûl dibe, hevalbûk*"dawet ferikî, berbûk hetikî" |
| **Bercîs** | gerestêkek e |
| **berçavk** | alava şûşeyî ya ku datînin ber çavan |
| **berçavkfiroş** | kesê ku berçavkan difiroşe |
| **berçek** | kesên ku amadeyî perwerdeya leşkerî û çekhildanê ne; destbidar |
| **berçêlk** | 1. mêjî, hewsele2. bersînga çivîkan |
| **berçile** | meha duwazdehan, berfanbar |
| **berdan[I]** | 1. terikandin2. jê vegerîn 3. dagerîn4. dest jê vekêşan |

| | |
|---|---|
| **berdan [II]** | 1. rih û por dirêj kirin 2. kinc bi ser de werkirin *"ji derdan, rih berdan" |
| **berdar** | 1. bibereket 2. têgihiştî 3. biadan |
| **berdayî** | 1. azadkirî 2. jina ji mêrî veqetiyayî |
| **berdelan** | erdê bikevir |
| **berdeq** | lîstikeke zarokan a ku li ser piyekî radiwestin û milên xwe li hev dixin hetanî yek ji wan bikeve |
| **berdeqanî** | alavake kevirhilfirandinê ya ku ji du bendikên dirêj û navendekê pêk tê, bi ba dikin û keviran pê diavêjin; kefkanî |
| **berdest** | 1. hazir, amade2. berhevkirî |
| **berdestî** | kesê ku di xizmeta xelqê de kar dike |
| **berdevk [I]** | kesê ku li ser navê welatekî ,alîyekî an jî sazîyekê diaxive û ramana wan der dibe |
| **berdevk [II]** | pêşmala ku didine ber devê zarokan da ku cilên xwe nelewitînin |
| **berdewam** | li ser kar |
| **berdewam kirin** | 1. domandin2. şopandin |
| **berdêl** | 1. biha, qîmet 2. şûndiyarî |
| **-berdêl kirin** | 1. ber ve dayîn 2. bi hev re guherîn |
| **berdil** | 1. ezîz 2. evîndar3. gerdenî |
| **berdilk** | 1. pêşmal 2. berdevk |
| **berdîwar** | 1. bêkes 2. sêwî3. belengaz |
| **berdû** | cîl û cegenê ku pê xesîlan çêdikin |
| **bere** | 1. cebhe 2. rû 3. enî |
| **bere bere** | hêdî hêdî ber bi asteke dîtir ve |
| **berecot** | pîvaneke qada erdê ye (920 m2) |
| **beredayî** | 1. bêxwedî 2. serbest 3. bêkêr 4. beytu |
| **berendam** | 1. kesê ku namzedê endamtiyê ye2. hêjayî hilbijartînê |
| **berendamî** | hêjatiya hilbijartinê |
| **berespî** | kevirê kilsê |
| **berevajî** | 1. çewtbûyî 2. serobinobûyî 3. hember4. zid, dij |
| **-berevajî vê yekê** | li hemberî vê yekê |
| **berevajî kirin** | 1. serobino kirin 2. têvel kirin |

| | |
|---|---|
| **berevan** | 1. parastvan2. parêzer |
| **berevanî** | 1. parastvanî2. parêzerî |
| **berevanî kirin** | 1. parastin2. lê xwedî derketin |
| **bereyîşk** | mencenîq |
| **berê** | 1. di pêş de 2. hê di zû de 3. ji mêj ve *"çû şamê û hat jî, dîsa kerê berê ye" |
| **berêvar** | 1. piştî esrê 2. nêzîkî tarîbanê *"berfa |
| **berêvarê** | , qirê tîne li debarê" |
| **berf** | barija ku kulî kulî dibare *"berfa çiyayê bilind, pir dibe" |
| **berfanbar** | meha 12'em a salnameya zayînî |
| **berfedîn** | belekiyên berfê ên ku ber bi vehelînê ve diçin |
| **berfemot** | helewa ku ji doşav û berfê tê çêkirin |
| **berfende** | aşît, şepe, renî |
| **berfiravîn** | xwarina sivik a beriya navrojê |
| **berfireh** | 1. çarmedor2. bi dorfirehî |
| **berfîn** | 1. cihê biberf 2. kulîlka ku piştî vehelîna berfê hêşîn dibe |
| **berfşo** | barana ku berf pê re dibare; şilope |
| **berg** | 1. cil, kiras 2. rûpela sereke ya kovar û pirtûkê |
| **-berg kirin** | 1. kiras kirin2. (pirtûk) cild kirin |
| **bergeh** | 1. dîmen 2. êwirgeh3. depê şanoyê, dik4. qad, meydan |
| **bergerîn** | 1. şîreta bi lavayî2. tembîha bi rica û tikayê |
| **bergew kirin** | xitimandin |
| **bergind** | berdêl |
| **-bergindî** | êlekê ye bi qasî eşîrekê hêja ye |
| **bergirî** | 1. tevdîr 2. berbend |
| **bergîdan** | 1. hilberîn 2. bereket 3. adan 4. berdêl5. bîmekarî *"E-legaz birinc be û Erez jî rûn be, heke bergîdan tune be, dîsan dê pûç be" |
| **bergîn** | pirtûka bicild |
| **bergîr** | mehîna ku nû ji canîtiyê derketiye dê were fehlan û avis bibe |
| **bergîz** | kincên kurdî yên zilaman ên ku ji merezî tên ristin; şal û şapik |
| **bergsazî** | karê amadekirina şeklê cildê pirtûk û kovaran |
| **berguhk** | alava ku ji serikekî an jî diduyan pêk tê û axaftinan radigîne |

| | |
|---|---|
| **berhem** | 1. eser 2. adan3. xebat |
| **berhemdar** | 1. biadan 2. xebatkarê ji bo kedekê |
| **berhevkar** | 1. civandî 2. amadekarê komkirinê |
| **berhev kirin** | 1. civandin2. kom kirin 3. tomar kirin *"ava rijiyayî, nayê berhev kirin" |
| **-berhev kir ji deriyan û da xêra miriyan** | ji parsê civande hev û ji bo quretiyê li xelqê belav kir |
| **berhevok** | 1. tomar, belavok 2. berhema ku hatiye komkirin |
| **berhewa** | 1. bêwate 2. bêkêr |
| **berhingar** | dij |
| **berhingar bûn** | pêrgî hatin |
| **berik[I]** | kevirên biçûk; xîç, xişir |
| **berik [II]** | fîşeng |
| **-berika nediyar** | fîşenga ku kes nizane ji kuderê hatiye û lê ketiye |
| **berizîn/diberize/biberize** | 1. har bûn 2. (seg) pelişîn hev |
| **berî [I]** | 1. besta bixîz 2. rastahî *"dinya ji hinekan re berî ye, ji hinekan re jî av û herî ye" |
| **berî [II]** | sade û hêsa |
| **berî [III]** | bêguneh û bêtawan |
| **berîk** | berîk |
| **berjeng** | 1. delîl û îsbat2. berateya nexweşiyê |
| **berjengî** | nîşaneya mirinê |
| **berjewendî** | meslehet |
| **-berjewendiya** | giştî mesleheta cemawerî |
| **berjewendîperest** | kesê ku li mesleheta xwe tenê digere |
| **berjêr** | 1. berbijêr 2. sernişîv |
| **berjor** | berbijor, hevraz |
| **berk [I]** | hewza avê |

| | |
|---|---|
| **berk [II]** | 1. sext, zexm2. şidiyayî 3. qewîn |
| **berkanî** | kefkaniyê keviravêtinê |
| **berkaz** | 1. pace, pencere2. perwaz |
| **berkeftî** | 1. biqîmet 2. muhterem 3. berdil |
| **berkel** | xwarina ku nêzîkê kelînê ye |
| **berkele** | golikê ku temebergîz nê wî nêzikî sê salan e |
| **berkeş** | sinî |
| **berkeşok** | siniya biçûk |
| **berkêr** | sewalê ku dê bê serjêkirin |
| **berkêr kirin** | ji bo serjêkirinê dermal kirin |
| **berkêşan** | 1. çêkirin 2. rokirin |
| **berkurk [I]** | 1. qirik, gewrî 2. berçêlk |
| **berkurk [II]** | mirîşka ku dema kurika wê hatiye |
| **berlêv** | qerax |
| **-berlêvên avê** | qeraxên avê |
| **-(baçik) berlêv kirin** | (bêyî ku ji devê xwe derxe) cixare kêşan |
| **bermal** | jina ber malê*"bermal, xwedana malê ye" |
| **bermalk** | bêra berfê; berfik |
| **bermax** | rûpelên baçikan |
| **bermayî** | 1. jêmayî 2. dawî |
| **bermîzk** | mîza ku nîşaneya qelewbûna sewalan e |
| **bernac** | kone, xasûk |
| **bername** | mijara sazbûyî |
| **bernamesaz** | kesê ku di sazî û dezgehan de mijaran amade dike |
| **bernav** | 1. navê pêşîn ê mirovan (navê sêqolî wekî: Azadê Lezgînê Celalî be, bernav: Azad e û paşnav jî Celalî ye) 2. navê din ê ku pê hatiye nasîn (her wekî: ji kesekî qebrax re Karêl bê gotin û wisa bê nasîn) |
| **beroj** | berpala ku tavê dibîne |
| **beroste** | pîşekarê nûgihiştî yê ku hîna nebûye hoste |
| **beroş** | amana ku ji qûşxaneyê mezintir û ji sîtilê biçûktir e *"dîz ji beroşê re dibêje: 'wê de here rû-teniyê!' " |

| | |
|---|---|
| **berpal** | 1. dibûr 2. beroj*"ba ji tehtê berpalê çi dibe?" |
| **berpêş kirin** | araste kirin, pêşandin |
| **berpirs** | kesê ku bi peywirekê radibe; peywirdar, wezîfedar |
| **berpirsiyar** | peywirdar/ wezîfedar |
| **berpirsiyarî** | peywirdarî, wezîfedarî |
| **berpisyar kirin** | kar û guneh xistin stûyê yekî an jî hinekan |
| **berpişt** | şala navê |
| **bersiv** | vegerandina pirsiyara kesekî; cewab |
| **-bersiv dan** | pirsiyara kesekî lê vegerandin; cewab dan |
| **bersojk** | nexweşiyeke aşikê ye |
| **bersojkî bûn** | ji mîdeyê azî kirin |
| **berstûk** | aliyê kincê yê ku dora stûyî dipêçe; paşstû, pastîn |
| **bersûc** | kesê ku ji ber tawanekê tê rapirsîn |
| **berşîv** | xwarina sivik a beriya şîva êvarê |
| **bertav** | cihê ku tîrêjên rojê lê digire |
| **bertav kirin** | li ber tîrêjên rojê raxistin |
| **bertek** | bi awayekî neyînî tevgerîna li dijî bûyerekê |
| **berteng** | 1. kembera li ser kulêmekan 2. kêmber |
| **bertîl** | 1. rişwet 2. kirt/qirt3. kamçûr *"çav ji çavan m dike, bertîl keviran nerm dike" şer |
| **bertûrk** | berçêlk |
| **berû [I]** | masiyek e |
| **berû [II]** | darek e |
| **bervang** | 1. pêşmal 2. berstûk |
| **bervihêr** | 1. biferaset 2. têgihiştî |
| **berwar** | 1. tiştê meyildar, xwar û vîç 2. dibûr, beroj 3. mêjû |
| **-berwar bûn** | 1. takêş bûn, di aliyekî de xwar bûn 2. weşweşîn |
| **-berwar kirin** | 1. takêş kirin, di aliyekî de xwar kirin2. weşweşandin |
| **berx** | têjika mihê *"berxên pir, ji mihên pir in" |
| **berxistin** | 1. eşkerekirin2. hînkirin |
| **berxistî** | pêşniyar |

| | |
|---|---|
| **berxvan** | kesê ku berxan diçêrîne |
| **ber xwe dan [I]** | 1. cîhad kirin 2. tê koşîn |
| **berxwedan [II]** | 1. cîhad2. têkoşîn |
| **berxwedar** | jîdirêj |
| **berxwedar bûn** | jîdirêj bûn |
| **berxwedêr** | 1. mucahid2. têkoşer |
| **berz** | bilind |
| **berzax** | heyama ji mirinê hetanî roja qiyametê |
| **berz bûn** | bilind bûn |
| **berze** | winda |
| **berze bûn** | winda bûn |
| **berzek** | navbir |
| **berze kirin** | winda kirin |
| **berzeq** | cinsî, zayendî |
| **berzex** | berzek |
| **berzile** | berzik |
| **berzik** | binzik |
| **berzî** | bilindahî |
| **berzîn[I]** | caniyê ku amadeyî perwerdekirina siwarbûnê ye |
| **berzîn [II]** | kulavê ku di bin zîn û kurtên de davêjin ser pişta hesp û keran |
| **berzîne** | kevirê rengrengî |
| **berz kirin** | bilind kirin |
| **bes** | 1. bi qasî têra xwe 2. lêbêlê *"dinya bûye kes, tu kesî negotiye: bes" |
| **beser** | çav |
| **besimîn/dibesime/bibesime** | 1. bişirîn 2. ken ber lêvan ketin |
| **besît** | 1. hêsa 2. di arûzê de qalibek |
| **best** | îlham |

| | |
|---|---|
| **-best lê rabûn** | îlham lê peyde bûn |
| **bestandin/dibestîne/bibestîne** | girtin, dadan |
| **bestenî** | şirîniya ku bi şîr, şekir û fêkiyan tê çêkirin û bi sarî tê xwarin |
| **bestin/dibeste/bibeste1** | . cebirîn 2. zeliqîn |
| **bestir** | 1. raxistina nava malê, ferş 2. mitêl |
| **beş [I]** | 1. çal 2. kesê ku di eniya wî de belekiyek heye *"çileyê reş, debarê diqedîne li gayê beş" |
| **-beş kirin** | di eniyê de nîşaneyek çêkirin |
| **beş [II]** | 1. par 2. behre 3. qisim 4. dabaş *"beş kete stûyê maldaran, avêtin serê hejaran" |
| **-beş kirin** | par kirin |
| **beşavend** | ahengdariya di dawiya ristên helbestekê de |
| **beşdar** | kesê ku tevî kar an jî çalakiyekê dibe |
| **beşdarî** | tevlêbûna kar an çalakiyekî |
| **beşdar bûn/beşdarî tê de kirin** | tev lê bûn |
| **beşer** | 1. feraset 2. fehm û zanîn |
| **-(jê) beşer kirin** | (di heqê tiştekî de) pispor bûn û jê zanîn |
| **beşerkor** | 1. bêferaset2. aqilsivik |
| **beşervekirî** | 1. rûken 2. rûbirqonek 3. biferaset |
| **beşişîn/dibeşişe/bibeşişe1** | . bişirîn 2. bişirîn3. ken ber lêvan ketin |
| **beşt** | 1. textikê stûr û dirêj2. kêranê avahiyan |
| **beşûş** | devbiken |
| **bet [I]** | ecemî, nûgihiştî |
| **bet [II]** | cureyekî perindeyan ê ku dişibihe werdekan*"ar ê kewan e, risq ê betan e" |
| **betal** | 1. destvala 2. bêkêr3. bêkar |
| **betal bûn** | 1. îbtal bûn 2. ji kar veqetîn 3. rawestîn |

| | |
|---|---|
| **betalî** | 1. bêkarî 2. destvalatî3. bêkêrî *"betalî, xerabmalî" |
| **betal kirin** | 1. netêw hesibandin2. kar rawestandin |
| **betan [I]** | di her tiştî de aliyê ji hundir ve |
| **betan [II]** | goştê nerme |
| **betilandin/di betilîne/ bibetilîne** | 1. westandin2. rawestandin |
| **betilî** | 1. westiyayî 2. rawestiyayî*"heta ku bûk xemilî, dawet betilî" |
| **betilîn/dibeti le/bibetile** | 1. westîn 2. vêsîn |
| **betir** | bêhtir, wêdetir |
| **betirpêr** | sê roj beriya niha |
| **betirpêrar** | sê sal berî niha |
| **betlane** | 1. tehtîl 2. raweste3. destûr |
| **betran** | kesê ku nefsa xwe pir diecibîne |
| **betûm** | bêqudûş |
| **betûmî** | bêqudûşî |
| **bevil** | 1. mirovê mînak 2. hevrik |
| **bevşik** | diranên qutkirinê |
| **bexişandin/d ibexşîne/ bibexşîne** | 1. efû kirin2. dayîn 3. xelat kirin |
| **-dan bexişandin dan** | efûkirin |
| **bexîl** | çiriz, timakar |
| **bexşan** | 1. efû 2. bexşîş, şabaş |
| **bext** | 1. talih 2. siûd*"çavê kor tuneye, lê bextê kor heye" |
| **-bext û miraz di çavan de man** | 1. ji hevalan man 2. negihiştin tu armancê |
| **bextewar** | 1. bihuzûr 2. aram |
| **bextewarî** | 1. bihuzûrî2. aramdarî |
| **bextiyar** | bextewar |

| | |
|---|---|
| **bextreş** | 1. bêtalih 2. bêsiûd |
| **bextvekirî** | xwedî-siûd |
| **bey** | pêşnîhada neqdî |
| **beyaban** | cihê xewle; çol |
| **beyan** | eşkeretî |
| **-beyan kirin** | eşkere kirin |
| **beyanî [I]** | eşkere *"bira biranî, bazar beyanî” |
| **beyanî [II]** | 1. spêde 2. sibeha zû |
| **-beyanîbaş!** | sibehxweş!, rojbaş! |
| **beyan-name** | nivîsa girîng a ku agehiyekê eşkere dike |
| **beyar** | erdê ku ji çandinê re dest nade; pesar, çol*"bela xelqê ji çol û beyaran tê, a min belengazê Xwedê jî ji ber piyên min tê" |
| **-beyar kirin** | zevîn neçandin |
| **beybûn** | kulîlkek e |
| **beytar** | bijîşkê sewalan |
| **beytarî** | karê bijîşkiya sewalan |
| **beytik** | cureyekî çivîkên biçûk e |
| **beytu** | 1. bêxwedî 2. beredayî |
| **bez [I]** | 1. rev 2. bazdan 3. çengkirin *"beza hes-pê, namûsa siwêr e" |
| **bez [I]** | donê ku bi goşt ve ye *"sibat hat û bihurt, nav û dilê gîskê bez girt" |
| **-bez bi stûyê pisîkê ve kirin** | 1. xurek spartin xurekxuran 2. emanet teslîmî xayînan kirin |
| **-bez girêdan** | 1. qelew bûn 2. komir bûn |
| **beza** | 1. revok 2. pêsivik, laşsivik |
| **bezek** | beza *"bizina kulek û şivanê bezek, tev digihêjin ber dêrî" |
| **bezandin/dibezîne/bibezîne1** | . dan revê 2. dan bazdan 3. xar kirin |
| **bezîn/dibeze/bibeze** | 1. revîn 2. baz dan *"hespê her kesî, li gorî bextê wî dibeze" |
| **-lê bezîn** | 1. lome lê kirin2. lê xistin |
| **-bezîn hev** | 1. bi hev re ketin devjeniyê 2. li hev xistin, pevçûn |

| | |
|---|---|
| **bezmik** | bihukek e |
| **bê [I]** | tiştê ku piştî dema niha tê |
| **-dema bê** | (r) dema ku ayendeyê dinimîne |
| **bê- [II]** | pêşgireke neyîniyê ye *"gul bê strî nabin" |
| **bêayîk** | 1. bêheyf 2. kesê ku heyfa wî tê hilanîn 3. derwêşê xwedîkeramet |
| **bêbav** | 1. kesê ku mêrê diya wî nîn e 2. qeleş3. bêeman |
| **bêbext** | 1. qeleş 2. xayîn*"mêrê bêbext pire be jî, bi ser re derbas nebe" bêbextî 1. qeleşî 2. xayîntî |
| **bêbextî kirin** | 1. qeleşî kirin 2. xayîntî kirin |
| **bêbine** | 1. bêqedr 2. kêmbiha 3. bêkêr |
| **bêbingeh** | 1. bêtar 2. bêesl3. bêbinî |
| **bêbinî** | 1. pir kûr 2. bê-wate |
| **bêçiv** | 1. bêziqzaq 2. bêfetl |
| **bêderman** | 1. bêilac 2. bêçareserî *"Xwedê, tu derdekî bêderman nedaye" |
| **bêdev** | 1. bêdeng 2. devmirî |
| **-bê dev û bê ziman** | 1. nezanê axaftinê 2. feqîr û belengaz |
| **bêdê** | 1. dêmirî 2. sêwî*"keça bêdê, weke çiyayê bêrê" |
| **bêdil** | 1. nexwestî 2. bêriza3. bêîştah |
| **bêg** | kesê ku xulamokê berjewendiyên xelqê ye |
| **bêgane** | 1. nenas 2. xerîb3. biyanî *"dilê bêganeyan, her bixem e" |
| **bêgar** | kesê ku bêpere û bêhember dixebite |
| **bêgav** | 1. neçar 2. bêderfet3. mecbûr |
| **bêgavî** | 1. bêçaretî 2. bêderfetî 3. mecbûrtî |
| **bêguman** | 1. bêşik 2. bêgav3. neçar *"bela, ji derê bêguman tê" |
| **bêgerd** | bêguneh |
| **bêgêwil** | bêkêf |
| **bêgêwil bûn** | dil çirmisîn |
| **bêgêwil kirin** | kêf lê revandin |
| **bêgêwilî** | bêkêfî |
| **bêgiyan** | mirî, bêcan |
| **bêhawe** | kesê ku beletewş û keteber tev digere |

| | |
|---|---|
| **bêhemal** | bêxwedî û bêsexbêr |
| **-bêhemal hiştin** | bêxwedî hiştin, bêsexbêr hiştin |
| **bêhemdî** | bêyî ku wisa bixwaze; bêqesd |
| **bêhempa** | 1. bêemsal 2. bêhogir 3. bêhevta |
| **bêhiş** | 1. bêaqil 2. kerose |
| **-bêhiş ketin** | 1. ji xwe ve çûn 2. sefêk bûn |
| **bêhn** | 1. hilm, neks, nefes2. heyberên ku bêfil pê dihese |
| **-bêhna xwe berdan** | navber dayîn |
| **-bêhn jê hatin** | bi bêfilê hate derxistin ku tiştekî bûdar heye *"kesê ku sîr nexwe, bêhn jê nayê" |
| **-bêhn jê teng bûn** | jê kerixîn |
| **-bêhn kirin** | 1. henase kişandin hundir 2. (tiştê bûdar) bi kepûyî tê derxistin*"dinya gulek e, |
| **bêhn bike** | û bide hevalê xwe" |
| **-bêhn lê çikandin** | 1. xeneq lê şidandin 2. bêqudûm hiştin |
| **-bêhn lê çikîn** | 1. nefes lê teng bûn 2. aciz bûn |
| **-bêhn pê ketin** | 1. jê hilm wergirtin 2. fis kirin3. genijîn |
| **-bêhn vedan** | westa xwe danîn |
| **bêhndar** | tiştê ku bêfil jê derdixe ka hilma wê çawa ye; bûdar |
| **bêhnefişk** | 1. hilkehilk, nefesên li ser hev 2. gumek ji kêşa baçikê |
| **bêhnfireh** | 1. bisebr 2. dilfireh 3. rûnerm |
| **bêhnok(r)** | nîşaneya vêsihê |
| **bêhnteng** | 1. bêsebr 2. bêtebat |
| **bêhntengî** | 1. bêsebrî 2. bêtebatî |
| **bêhtir** | 1. zêdetir 2. wêdetir |
| **bêjandin/dibêjîne/bibêjîne** | ji bêjingê re derbas kirin, seridandin |
| **bêje** | peyv, kelîme |

| | |
|---|---|
| **bêjer** | gotî, axafger bêgav |
| **bêjing** | alava qulqulî ya ku zadê çê û qeselê wî ji hev vediqetîne |
| **-bêjing kirin** | bi bêjingê zadê çê û qesel ji hev jibartin |
| **bêjî** | bîj |
| **bêkar** | 1. bêîş 2. betal |
| **bêkes** | 1. xizan 2. bêgav*"dilê bêkesan, li ser hemû kesan dişewite" |
| **bêkêr** | 1. bêxêr 2. ji tu tiştî re destnedayî |
| **bêlête** | govend |
| **bêmêjî** | 1. bêhiş, bêaqil2. ehmeq |
| **bênamûs** | 1. bêar 2. xîret3. qehbik *"eyarê bênamûsan fireh e" |
| **bênamûsî** | 1. bêarî 2. bêxîretî 3. qehbiktî |
| **-bênamûsî qebûl kirin1** | . tola xwe li erdê hiştin2. tolaziya jina xwe pejirandin |
| **bênavber** | bi berdewamî |
| **bênder** | 1. cihê ku zad lê tê kutan *"bazar xweş e li bênderê, ne li zeviyê" bênefsî çilektî, silektî*"kalê ji bênefsiyê û pîrê ji bêkesiyê hev û du pirsîne" |
| **bênimêj** | 1. kesê ku nimêj nake 2. herimî, gemar |
| **bênimêjî** | dema ku jin heyvane avê dibînin |
| **bênimêj bûn** | 1. (jin) ketin kirasan, heyz bûn 2. herimîn |
| **bêpar** | 1. mehrûm 2. bênesîb |
| **-bêpar mayîn** | 1. mehrûm man 2. bênesîb man |
| **bêpayan** | 1. bêhevta 2. bibiha |
| **bêqudûm** | 1. bêmecal 2. westiyayî |
| **bêr** | alava kolandinê *"jin û mêr, weke tevr û bêr" |
| **bêrawestan** | 1. di qîjekê de 2. bê navber |
| **bêrê** | 1. nelirê 2. bêusûl |
| **bêrêtî** | 1. nelirêtî 2. bêusûlî |
| **bêrik [I]** | 1. cêb 2. cêba paşilê *"destê kefîlan, di bêrika wan de ye" |
| **bêrik [II]** | alava biçûk a ku xwelî pê tê hildan |
| **bêrî [I]** | 1. bêguneh 2. rûpak |
| **bêrî [II]** | cihê ku pez lê tê dotin *"ha şêwra jinan, ha bêriya bizinan" |
| **-dan bêriyê** | pez di şîştira dotinê de ber bi bêrîvanê ve ajotin |

| | |
|---|---|
| **bêrî [III]** | xwesteka dîtinê |
| **-bêrî kirin** | ji bo dîtinê bi xwestek bûn |
| **bêrîk** | di kincan de cihê ku kîsikekî tê hiştin; cêb *"hevalê bêrîka vala, tuneye" |
| **bêrîvan** | jina ku pêz û bêrîvan dewêr didoşe |
| **bêrvî** | alava ku di lûleyê de herka avê têkûz dike |
| **bêsemt** | bêîhtiyat |
| **bêserî** | 1. pir fireh 2. bêxwedî |
| **-bê serî û bê berate çûn** | bê xwedî û bêyî ku tu şopekê li pey xwe bihêle çûn |
| **bêserûber** | keteber û pir fireh |
| **bêsiûd** | bêbext, bêtalih |
| **bêş** | 1. kamçûr 2. xûgî 3. bac |
| **bêşik** | 1. bêguman 2. teqez |
| **bêtar** | felaket, karesat, afet, bobelat |
| **bêtehr** | 1. bêhawe 2. bêpîvan |
| **bêteşe** | 1. danerotî 2. serobero |
| **bêtewş** | 1. bêhevseng 2. beletewş |
| **bêv** | tora masîgiriyê ya ku ji çeperên darî hatiye çêkirin |
| **bêvan** | kes an jî tiştê nediyar |
| **bêvil** | endamê bêhnhilkirinê; poz, kepû |
| **-bi bêvilê girtin** | hişyar kirin |
| **-bêvila xwe daliqandin** | mirûzê xwe tirş kirin |
| **bêvîr** | 1. nexweşê li ber mirinê 2. jihêzketî |
| **bêwelat** | 1. bêcih û bêwar2. bêêl 3. biyanî *"mirovê bêwelat, mîna çûka bêper û bêbask e" |
| **bêxêr** | 1. bêkêr 2. serxur*"dostê bixêr, ji birayê bêxêr çêtir e" |
| **bêxwedî** | 1. bêsexbêr 2. bêhemal 3. bêkes*"bêndera bêxwedî, ji mirovî re nabe bênder" |
| **bêyî** | (tiştekî) (ew tişt) ne tê de |
| **bêyom** | bêqudûş |
| **bêzar** | 1. betilî 2. tengezar |

| | |
|---|---|
| **-bêzar bûn** | 1. betilîn 2. tengezar bûn |
| **-bêzar kirin** | 1. betilandin2. tengezar kirin |
| **bêzirav** | 1. newêrek 2. ziravqetî |
| **bêzû** | cureyekî nexweşiyên hişaloziyê ye |
| **bi** | 1. daçekek e 2. pêşgireke ku tevahiyê dide wateyê |
| **-bi bandor** | bi tesîr |
| **-bi boneya** | bi munesabeta…, bi sedema ... |
| **-bi dizî** | 1. dizîka 2. bêhay, bêxeber |
| **-bi dor** | di şîştirê de |
| **-bi dorvegerî** | di rêzê de, di şîştirê de |
| **-bi giştî** | bi gelemperî |
| **-bi hev re** | 1. tevayî 2. ba hev *"berx û gurên tirkan, bi hev re diçêrin" bêrvî |
| **-bi hêsanî** | ne bi zorê |
| **-bi jimare** | bi ededeke diyar |
| **-bi kinayî** | bi kurtasî û ne dûvedirêjî |
| **-bi kotekî** | bi darê zorê |
| **-bi min** | li gorî min |
| **-bi nav û deng** | navdar, meşhûr |
| **-bi piranî** | 1. zêdetir 2. bi gelemperî 3. bêhtir |
| **-bi rastî** | ne bi derew, di heqîqetê de |
| **-bi rêk û pek** | 1. bi pergal2. têkûz |
| **-bi roj** | wexta ku tav heye |
| **-bi ser de** | pê re *"kera xwe bi kerekê da, cilika wê jî bi ser de da" |
| **-bi şev** | êvarê |
| **-bi şev û roj** | sibeh û êvarê |
| **-bi şêt û pêt** | bi şivê û hêzê |
| **-bi şêweyeke berevajî** | bi awayekî çewt |
| **-bi taybetî** | xusûsî, ne bi gelemperî |
| **-bi tenê** | 1. bi serê xwe2. hişk û hola |
| **-bi tevayî** | bi giştî, hemû |

| | |
|---|---|
| **-bi tundî** | bi zextî, bi pêkutî |
| **-bi vî awayî** | bi vî cureyî, bi vî tehrî |
| **-bi vî rengî** | bi vî şiklî, bi vî celebî |
| **-bi vî şêweyî** | bi vî awayî, bî vî rengî |
| **-bi zanayî** | bi awayekî têgihiştî û li ser hişê xwe |
| **-bi zorî** | bi kotekî *"hesinê sar, bi zorî tê kutan" |
| **biaqil** | 1. xwedîferaset 2. jîr û jêhatî *"barê biaqilan, pişta kêmaqilan" |
| **bi ber bayê yekî ketin** | pê xapîn |
| **bi bîr anîn** | di zêhna xwe de gerandin *"ger mirov xeraban nebîne, başan bi bîr nayine" |
| **bi bîr birin** | 1. îdrak kirin2. tê derxistin 3. pê hesîn |
| **bi bîr xistin** | hizra yekî ji bûyereke qewimî re amade kirin |
| **bi cih anîn** | 1. pêk anîn2. kirin |
| **bi cih bûn** | 1. tê de rûniştin2. tê de êwirîn |
| **bi cih kirin** | 1. şûn kirin 2. dewisandin 3. rûniştandin4. êwirandin, sitirandin, hewandin |
| **biçrik** | nanê di rûn de qijirandî |
| **biçûk** | 1. nemezin 2. hûrik3. zarok *"biçûk li cihê xwe, mezin li cihê xwe" |
| **-biçûk xistin** | 1. rûmeta yekî şikandin 2. bênirx kirin |
| **-biçûk dîtin** | 1. biçûk biçûk biçûkahî xistin 2. bi pozbilindî lê nêrîn |
| **biçûkahî** | 1. nizmî 2. hûriktî3. zarokatî |
| **bi dawî bûn** | 1. encam dan2. kuta bûn, qedîn, xilas bûn, red bûn |
| **bi dawî kirin** | 1. jê encamek wergirtin 2. kuta kirin, qedandin, xilas kirin, red kirin |
| **bi derengiyê xistin** | 1. taloq kirin 2. paş de avêtin3. paşê bi cih anîn 4. egle kirin |
| **bidil** | 1. jidil 2. bi xwestinî3. bi rizaya xwediyî |
| **bi dûr ketin** | jê veqetîn |
| **bi dûr xistin** | 1. jê veqetandin2. şandin tarawgehê |
| **bi encam bûn** | 1. pêk hatin2. bi dawî bûn |
| **bi girî vekirin** | 1. giriyandin2. qehirandin |
| **bigor** | alava ku pê tîna gêrebayê tê teselekirin |
| **biha** | 1. qîmet, qedr 2. nirx *"arê kewan re, risqê biha re" |

| | |
|---|---|
| **biha bûn** | 1. biqîmet bûn, biqedr bûn 2. binirx bûn |
| **bihaname** | kaxeza ku bihayên kel û pelan li ser hatiye nivîsandin |
| **bihar** | demsala vehelîna berfê û destpêka hêşînahiyê*"heta peyv neyê karê, yek naçe biharê" |
| **biharat** | ardê giyayê tamxweş û bêhinxweş ê ku dikin nav xwarinan |
| **bihare** | cureyekî genimê ku biharê tovê wî tê reşandin |
| **bi hev şa bûn** | 1. hev xwestin 2. hev kirin |
| **bihêl** | kaxeza ku destûrê dide kar an jî çalakiyekî wek şano, tirad û hwd |
| **bihêz** | 1. xurt, biquwet2. desthilatdar |
| **bihîstin/dibihîze/bibihîze 1** | . bi guh seh kirin2. guhdarî kirin 3. haydar bûn 4. pê hesîn*"gava mitrib nebihîzin, êdî defê diqetînin" |
| **bihîstok** | alava ku pê tê bihîstin û guhdarîkirin |
| **bihîstyar** | 1. guhdar 2. peywirdarê çi bê guhê wî 3. hesas |
| **bihost** | bihust *“bihosteke tevna çêkirî, ji barekî rîs çêtir e” |
| **bihuk** | hemû cureyên kêz û mêşan; heşere *“dayê bihuk e, jinê ruhik e” |
| **bihujandin/dibihujîne/bibihujîne** | helandin |
| **bihujîn/dibihuje/bibihuje** | helîn |
| **bihur** | 1. di cihên teng de şûna ku berteng e 2. avtenga ku derfeta derbasbûnê dide *"çem bê bihur nabin" |
| **bihurtin/dibihure/bibihure** | derbas bûn |
| **bihust** | maweya di navbera kefedesteke vekirî; bost, bihost *"dema ku bextewarî nebe dost, fayde nake gera bihust bi bihust" |
| **-bihust bi bihust pîvan** | baş endaze girtin |
| **bihuşt** | cenet *"bihuşt, li rûyê erdê ye" |
| **bihuştîn** | cenetmekan |
| **bij** | 1. hêza xwarinê; bîz, îştah, mehde 2. qilde, qirqal |

| | |
|---|---|
| **bijandin/dibijine/bibijine 1** | . dil avêtin, mehdeyê xwe kişandin tiştekî2. tê gerandin 3. çilkandin, lê reşandin |
| **bijang** | perikên çavan |
| **bijarte** | hilbijartî, sahibrewac |
| **bijartin/dibijêre/bibijêre1** | . hilbijartin 2. tercîh kirin *"jinan mebijêre, esl xêr e" |
| **bijinandin/dibijinîne/ bibijinîne** | 1. tê gerandin2. îştah kişandin*"bi eşqa mêwijan, dil dibijinîne gûwijan" |
| **bijiqandin/dibijiqîne/ bibijiqîne** | 1. beloq kirin2. perçifandin |
| **bijiqîn/dibijiqe/bibijiqe1** | . beloq bûn 2. perçifîn |
| **bijî!** | aferîn! |
| **-bijî azadî!** | bila azadî her hebe! |
| **bijîn/dibije/bibije** | 1. qildeyê wî hildan, mehdeyê wî kişandin 2. tê gerîn, lê alîn 3. çilkîn |
| **bijîreş** | simbil |
| **bijîşk** | tebîb, hekîm |
| **bi kar anîn** | 1. xebitandin, şixulandin 2. kelk jê wergirtin |
| **bi kar hatin** | bi kêrî tiştekî hatin |
| **bikarhêner** | 1. kesê ku dixebitîne 2. kesê ku sûdê jê werdigire |
| **bi kêr hatin** | 1. sûdwer bûn 2. layîq bûn |
| **bikêrhatî [I]** | 1. sûdwer2. layîq |
| **bikêrhatî [II]** | 1. pêwist2. destdayî |
| **bikir [I]** | kesê ku dan û standinekê dike |
| **bikir [II]** | kesê ku kar an jî çalakiyekê dike |
| **bikirk** | binê bîr, kanî, çal, aman û hwd |
| **bikuj** | kujer, qatil, mêrkuj |
| **bila** | peyveke ku carinan xwestekekê û carinan jî karekî bilanî rave dike |
| **-bila be** | xem nake, tiştek bila nake |

| | |
|---|---|
| **-bila bibêjin xençera Xaço heye** | ji bo quretiyê tiştek bi xwe re gerandin |
| **-bila were** | heke dikare hatina wî çêtir e |
| **-bila çavê min te nebîne** | cardin dernekeve pêşberî min |
| **bilan** | îhtimal |
| **bilandin/dibilîne/bibilîne1** | . miremir kirin 2. taloq kirin 3. egle kirin |
| **bilanî** | îhtimalî |
| **bilbil** | cureyekî çivîkên awazxweş e *"bilbil bi dengê xwe, mêrxas bi cengên xwe" |
| **bilcim** | kesê ku tevî her karî dibe |
| **bildbildo** | 1. gingino 2. lalo, tato |
| **bildebild kirin** | 1. ginegin kirin, di bêfila xwe de axaftin 2. wekî lal û tatan axaftin |
| **bi lêv kirin** | 1. ji dêv avêtin2. der birin 3. şehitandin |
| **bilik** | (di zimanê zarokan de) mûzî, kîr |
| **bilind** | 1. berz, ber bi jor ve dirêj 2. quloz |
| **bilindahî** | 1. berzî, dirêjahiya ber bi jor ve 2. quloz |
| **bilind bûn** | 1. berz bûn 2. hevraz bûn 3. quloz bûn |
| **bilind kirin** | 1. quloz kirin2. berz kirin 3. hevraz kirin 4. bi ser xistin*"kurê çê, navê bavê xirab bilind dike" |
| **bilî** | xeyrî |
| **bilîn/dibile/bibile** | 1. pê re mijûl bûn 2. pê ve egle bûn |
| **bilqîn/dibilqe/bibilqe** | (av) fişkîn û fûrîn |
| **bilqînî** | dengê fişkîniya tiştên avî |
| **bilûl** | qalibê rokirinê *"dêla sê, sê salan têxin bilûlê, sala ku derxin her xwar e" |
| **bilûr** | alava dengjeniyê ya ku bi pifkirinê tê lêxistin*"bilûra li ber gê ye, çiraya li ber kûreyê ye" |
| **bin** | 1. tar 2. qûntar 3. cihê jerîn ê her tiştî |
| **binate** | 1. şop 2. binyad, xîm 3. bineçe |

| | |
|---|---|
| **binaşe** | binate |
| **bi navê lîstin** | 1. pişta reqîbekî li erdê xistin 2. zoran kirin |
| **bi nav kirin [I]** | 1. pênasek lê danîn 2. wate lê bar kirin |
| **binav kirin [II]** | noqî kûrahiya avê kirin |
| **binbar** | peywirdar |
| **bincan** | dîwarê ku li ber ava herikbar tê jenîn |
| **bincî** | nivîna stûr a ku li bilan serê tê razan |
| **binçavî** | 1. tewqîf 2. rawestan |
| **binçav kirin** | 1. tewqîf kirin 2. rawestandin |
| **binçeng** | qefa binê her du milan |
| **-pûrta binçengê** | pirça ku di bin çepilan de hêşîn dibe |
| **bindeq** | 1. cureyekî darên biber e 2. berên vê darê |
| **bindest** | kesê ku azadî û aramiya wî bi mercan ve girêdayî ye; ketî |
| **bindestî** | rewşa kêmazadiyê ya ji ber mercen derveyî; ketîtî |
| **binecih** | xwecih, rûniştî |
| **-bi binecihî kirîn û firotan** | bi hemû milkiyetê ve kirîn û firotan |
| **bineçe** | binate |
| **binefş** | cureyekî gulan e |
| **binefşî** | rengê di navîna sor û hêşîn de |
| **binesazî** | tardanîn, xîmavêtin |
| **binetar** | 1. esasê her tiştî2. di nivîsekê de bendên xwendinê |
| **binfisî kirin** | 1. hêkên xwe genî kirin 2. nebaşiyên xwe veşartin |
| **-bingeh** | tar, xîm/hîm |
| **-bingeha aborî** | hîmê îqtisadî |
| **-bingeh danîn** | tar danîn, xîm avêtin |
| **bingehîn** | esasî |
| **binik** | 1. binê îskanê 2. bincixare |

| | |
|---|---|
| **binî** | bin |
| **-binî dan tavê** | karê xwe giş qedandin |
| **binîje** | di avahiyan de taqê li herî biniyî |
| **binkask** | kasika ku digel piyanê tê danîn |
| **binkirask** | kinca tenik a ku di bin cilên derveyî de tê lixwekirin |
| **binpê kirin** | 1. pêpest kirin 2. îxlal kirin |
| **bintîn** | 1. mal û milk 2. sexbêrî |
| **(bi) bin xistin** | 1. berjêr kirin 2. mexlûb kirin, sernuxûn kirin |
| **binyad** | tar, bingeh *"jina malê, binyadan dizane" |
| **biok [I]** | kirêt |
| **biok [II]** | heşerat, bihuk bi pêş ve çûn perisîn û meşîn |
| **bir** | 1. beş 2. qisim 3. par4. kerî 5. tîke |
| **bira** | kesê ji dê an jî bavê mirovî *"tenê bira, di hawara birê de tê" |
| **-birayên hûrekî** | 1. ji heman dê û bavî 2. dizên tûrekî |
| **birale** | şitil |
| **biramak** | kesên ji eynî dayikê lê ne ji heman bavî |
| **birandin/dibirîne/bibirîne 1** | . binevat kirin2. îmha kirin 3. tune kirin |
| **biraşîr** | kesê ku di dema zarotiya wî de wî jî şîrê diya wî mêtiye; şîrbirak |
| **biraşte** | alava ku li serê goşt tê pijandin |
| **biraştin/dibirêje/bibirêje** | goşt pijandin *"êgir girte mala yekî, yê din got: 'tu bi Xwedê venemirîne, da ku (ez) kewên xwe li serê bibirêjim'" |
| **biratî** | 1. hevpişkiya di dê an jî bavî de 2. rewşa kesên ji heman olê *"biratî bi baran, hesab bi misqalan" |
| **biraza** | lawê birayê mirovî |
| **birazava** | kesê ku di daweta zavê de xwedîtiya wî dike |
| **birazî** | keça birayê mirovî*"ap bi biraziyan re dike, xal bi xwarziyan re dike" |
| **birc** | 1. avahiyê bilind û asê yê ku ji bo zêrevanîyê tê bikaranîn 2. kêlû |
| **birçêk** | lîstika cirîdê |
| **birçî** | 1. kesê ku pêdiviya wî bi xwarinê heye; nêzdeçûyî2. netêr 3. zikvala*"çavên birçî, tu carî têr nabin" |

| | |
|---|---|
| **-ji birçînan zik miz dan** | tiştek nedîtin ku bê xwarin |
| **birçî bûn** | 1. zikvala bûn2. ji nêz de çûn, birsî bûn *"kûçik birçî dibe, gûyê xwediyê xwe dixwe" |
| **birçîtî** | 1. nêzdeçûn 2. netêrî, zikvalatî |
| **birek** | alaveke hesinîn a ku pê dirankên wê yên tûj dar, lek û hwd tên qutkirin |
| **bireser** | (r) karê ku kirde dike |
| **bireş** | 1. xizan, feqîr 2. belengaz |
| **bi rê ketin** | 1. sefer kirin2. meşîn *"heke biçûk li gor mezinan bi rê nekevin, dê lingên wan timî li keviran bikevin" |
| **bi rê kirin** | 1. bi rê xistin2. şandin |
| **bi rê ve birin** | 1. îdare kirin 2. kar gerandin |
| **bi rê ve çûn** | 1. meşîn2. bizîn |
| **bi rê xistin** | 1. meşandin2. şandin |
| **birêxistin bûn** | bipergal bûn |
| **birêxistin kirin** | bipergal kirin |
| **birêxistî** | bipergal |
| **birêz** | 1. giranqedr 2. birûmet |
| **birgeh** | 1. cihê birînê 2. cihê vebirînê 3. di peyvê de cihê rawestanê wek: ba-jar, cen-ga-wer... 4. cihê hevgirtina gehan |
| **birhan** | delîl û îsbat |
| **birin/dibe/bi be** | neqil kirin |
| **birik** | bayekî bêhnkirêt ê ku piştî zadxwarinê ji devê mirovî derdikeve, qirpik |
| **birinc** | cureyekî zadê ku li cihên avî hêşîn dibe*"erd birinc be jî, av rûn be jî, heke xwedî tunebe zû diqede" |
| **biriskandin/dibiriskîne/ bibiriskîne** | teyisandin, çirûsandin |
| **biriskîn/dibiriske/bibiriske** | teyisîn, çirûsîn |

| | |
|---|---|
| **birîn/dibire/ bibire [I]** | 1. qut kirin 2. jê kirin*"hezar carî bipîve, carekê bibire" |
| **birîn/dibire/ bibire [II]** | 1. binevat bûn 2. qiriyan3. kuta bûn |
| **birîn [III]** | 1. di lêş de cihê zedegirtî 2. cihê ku kêm û îltihab girtiye *"birîna dijûnê, ji birîna şûrê neyêr kambaxtir e" |
| **çivînî** | 1. biziqzaq 2. fetlfetlî 3. xilimxwarî |
| **çiya** | kêrtê bilind *"çiya çiqas bilind be jî, dê rê pê keve" |
| **çiyakêş** | kesê ku hildikişe kêrtên bilind |
| **çiyanişîn** | kesê ku li herêmên çiyayî dijî |
| **çiyayî** | tiştê/kesê ku li çiyan heye/li çiyan dijî |
| **çizîn/diçize/ biçize** | (di dema pijandinê de) jê dengê şewatê hatin*“çizîna nanê genimî, ji kezebê tê” |
| **çizirîn/diçizir e/biçizire1** | . ji ber çûyîn 2. qul bûn 3. gizirîn |
| **çîç** | 1. arastî û xemilandî2. (di zimanê zarokan de) rind û bedew |
| **çîç bûn** | 1. xemilîn 2. (di zimanê zarokan de) rind û bedew bûn |
| **çîçek** | xemla dar û çêreyê; kulîlk |
| **çîçekdank** | kulîlkdank |
| **çîçelan** | 1. tiştê ku temtêla wî xweşik dixuye 2. cihê dîmenxweş |
| **çîçeve kirin/çîç kirin** | 1. xemilandin 2. (di zimanê zarokan de) rind û bedew kirin |
| **çîçik** | (di zimanê zarokan de) pêlîstok |
| **-çîçik û vîçik** | 1. pêlîstokên zarokan 2. xemlên bêbine û hûrde |
| **çîçî** | 1. ifet 2. namûs |
| **çîk [I]** | 1. çirûsk 2. pêt3. alafa pêşîn |
| **çîk [II]** | ango, wate |
| **çîl** | rengê vekirî |
| **çîlan** | devhuçika fireh û dirêj |
| **çîlspî** | rengê spî yê lap vekirî |
| **çîleçep** | 1. berevajî 2. xaromaro |
| **çîm [I]** | erdê ku çêreya wê gurbiz e |
| **çîm [II]** | ling |
| **çîman** | erdê ku çêreya wê gurbiz e |
| **çîmanzar** | erdê ku her dera wî bi çêreyeke gurbiz rapêçandî ye |
| **çîn [I]** | 1. moçik 2. neqş |

| | |
|---|---|
| **çîn [II]** | hêza şiyanê; tewax, tewan |
| **çîn [III]** | sinif, tebeqe |
| **çîn [IV]** | 1. xeleq 2. badok, kurîşk |
| **çînandin/diçinîne/biçînîne 1** | . hûr kirin (tev tiştekî) 2. (bi ser de) pişirandin |
| **çînandî** | 1. hûrkirî 2. pişirandî3. amade |
| **-nanê çînandî** | 1. nanê ku hûrî tevî xwarinekê kirine 2. xwarina hazir |
| **çînayetî** | tebeqî çînik tûncika jinan |
| **çînîn/diçînîne/biçînîn1** | . neqişandin 2. moçik lê kirin |
| **çîp** | ji çongê berjêrtir aliyê pêşiyê yî ling |
| **-çîp lê duta vebûn** | geh lê sist bûn û pelişîn erdê |
| **çîplot** | 1. çîprût 2. şeqrût |
| **çîprût** | lingtazî |
| **çîqal** | 1. qels, lawaz, jar, zeîf 2. eware, yax |
| **çîrçîrî** | parçeparçeyî, zîvalzîvalî |
| **çîrçîrî kirin** | parçeparçeyî kirin, zîvalzîvalî kirin |
| **çîrevîr** | vir û derew |
| **-çîrevîr kirin** | vir û derew kirin |
| **çîrik** | qaxê fêkiyan |
| **çîrok** | hikayeyên dirêj ên bi efsûn û xeyalî |
| **-çîrokên jinebiyan** | gazincên bêrûmet û vala |
| **çîrokbêj** | kesê ku hikayeyên dirêj ên bi efsûn û xeyalî vedibêje |
| **çîroknivîs** | 1. karê nivîsîna hikayeyên dirêj ên bi çîçelan efsûn û xeyalî 2. berhevkarê çîrokan |
| **çît [I]** | 1. cureyekî qumêş e 2. destmalên ku bi qaliban hatine rengandin |
| **çît [I]** | dîkê ku saleke temenê xwe temam nekiriye |
| **çîtik** | 1. qurhekêşî, peşkavêjî2. şilimziwa |
| **çîtik kişandin** | 1. qurhe kişandin, peşk avêtin2. şilimziwa avêtin |

| | |
|---|---|
| **çîv** | 1. destikê destarî 2. di erebeya gan de darikê ku di ber tayeyê de diçikînin da ku ji surnî nefilite*"çîvê stûr e, tixûb dûr e; çîvê zirav e tixûb av e" |
| **çîveçîv** | dengê domdarê çivîkan; vîçevîç |
| **çîz** | mêşa hespan; moz |
| **çîzeçîz** | 1. dengê zîz, |
| **çîzînî** | 2. mizemiz çîzînî vizînî, vingînî |
| **çîzok** | mizmizok ço şiv *"mebe çoyê di destê dînan" |
| **çoçik** | derdana ku qehwe tê de kelandin, cezwe |
| **çogan** | 1. şiv 2. çirpî 3. gopal |
| **çokar** | xizmetkar |
| **çol** | 1. beyar 2. berî*"mêr çol e, jin gol e" |
| **çolbir** | riya kurt |
| **çolik** | destço |
| **çolistan** | 1. sehra 2. berî, ne deşt |
| **çomax** | 1. tiştê serpopil2. şiva sertompiz |
| **çong** | herewera di navenda ling de; jinû *"heke te da nava avê, ha li çongê ha li navê" |
| **-çong lê şikestin** | 1. (pir) betilîn 2. (ji tirsan) tev negerîn 3. bêtaqet man |
| **-çong lê sist bûn** | 1. (wekî berê) jêhatî nebûn 2. (ji tirsan hêz lê) şikestin û daxwarin |
| **çopçepîsk** | margîse |
| **çopî** | 1. xesb 2. talan |
| **çopandin/diçopîne/biçopîne1** | . bi zorê jê standin 2. talan kirin |
| **çopîk** | 1. ehmeq 2. gêj |
| **çoqil** | ling |
| **çoqildirêj** | lingdirêj |
| **çors** | 1. şevekorî 2. serobero, keteber |
| **çortan** | toraqa hişk-kirî |
| **çoş kirin** | ker ajotin *"kera ku barê te ne lê be, ne çoş kê ne doş kê" |
| **çov** | 1. şiv 2. gopal |

| | |
|---|---|
| **çu** | tu |
| **çune** | 1. tune 2. sifr, (0) |
| **çurtanok** | hestiyê serçongê |
| **çûçanêk** | (di zimanê zarokan de) biçûçik |
| **çûç kirin/çûçî kirin** | (di zimanê zarokan de) rûniştin |
| **çûk** | çivîkên biçûk *"her çûk, bi zimanê xwe dixwîne" |
| **çûle** | xelqkenandî |
| **çûm** | 1. baqek giyayê hişk ê girêdayî 2. defşe, baq |
| **çûn** | çûyîn |
| **-çûn ava** | (roj, heyv, stêrk) qulibîn |
| **-çûn ber tira cahşikan1** | . bêpar û bêpeşk mayîn2. bi kêrî tu karî nehatin û ji neçariyê gavanî kirin |
| **-çûn ser dilovaniya xwe** | çûn ber rehma Xwedê |
| **çûr [I]** | zerînî |
| **çûr [II]** | terş û talan, çop |
| **çûr bûn** | 1. tûşî talanbûnê hatin 2. dêrz bûn |
| **çûr kirin** | 1. talan kirin2. dêrz kirin |
| **çûv** | bizava revînê |
| **-çûva roviyan** | bazdana bi lezgînî |
| **çûv dan/çûv kirin** | gavek li vir û yek li dera han xistin |
| **çûyîn/diçe/biçe(here)** | 1. nehatin 2. ji vir ber bi cihekî din ve meşîn*"bi lavelavê, mirov ji ber jina xwe naçe der" |

# D

| | |
|---|---|
| **D/d** | tîpa pêncemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku li gorî cîderka wê diranî ye, li gorî belavbûna wê girtî û nerm e |
| **da- [I]** | pêşgireke ku bi lêkerê ve dizilîqe û wateya berbijêriyê didê |
| **da [II]** | dayik |
| **dab** | tele, dafik |
| **dabarandin/ dadibarîne/d abarîne** | 1. bi ser de rijandin 2. dan guleyan |
| **dabarîn/dadi bare/dabare** | hetikîn |
| **dabaş** | 1. mijar 2. behs, babet |
| **daberizîn/da diberize/ daberize** | 1. êrîş kirin2. belapêşkarî yekî bûn |
| **dabestin/da dibeste/dabe ste1** | . girêdan 2. kuta kirin 3. bi encam kirin |
| **dabeş** | 1. parçe, par 2. qisim3. kerî |
| **-dabeş kirin** | 1. parçe kirin2. parve kirin 3. kerî kirin |
| **dabêlandin/ dadibêlîne/d abêlîne** | 1. daqurtandin2. vegemirandin*"kesê çavbirçî, kerê bibar dadibêlîne" |
| **dabir** | (r) nîşaneya bêhnokê ya ku li jora peyva resen tê danîn |
| **dabiristin/da dibirisîne/da birisîne** | 1. rêz bi rêz bûn 2. sef girêdan3. ketin şîştirekê |
| **dabîn kirin** | 1. bîme kirin2. ewle kirin |
| **daçek** | (r) peyvên bêwate ên mînanî /li, bi, ji…/ ên ku di hevokê de bi peywirekê radibin |
| **daçikandin/d adiçikîne/da çikîne** | 1. di erdê de bi dirêjahî bi cih kirin 2. çikilandin 3. hincikandin |
| **dad** | 1. dayik 2. edalet |

| | |
|---|---|
| **dadan/dadide/dade [I]** | 1. girtin 2. zirze kirin*"deriyê xêran, nayê dadan" |
| **dadan/dadide/dade [II]** | (agir) pê xistin |
| **dadgeh** | mehkeme |
| **-dadgeha lihevanînê** | mehkemeya sulhê |
| **-dadgeha sezayî** | mehkemeya cezayî |
| **dadger** | hakim |
| **dadik** | jinika ku ber diya wan ve çavdêrî an jî sexbêrîya zarokan dike |
| **dadî** | huqûqî |
| **dadmend** | dadwer |
| **dadparêz** | huqûqparêz |
| **dadwer** | adil |
| **dadwerî** | adilbûnî |
| **dadyane** | adilane |
| **dafik** | xefik, tele *"roviyê zexel, bi her du lingan dikeve dafikê" |
| **dager** | 1. dahatina ber bi jêrê 2. veger |
| **dagerandin/dadigerîne/dagerîne** | 1. berjêr kirin2. anîn xwarê 3. lê vegerandin |
| **dagerîn/dadigere/dagere 1** | . peya bûn 2. hatin xwarê 3. lê vegerîn |
| **dagirker** | îşxalker, vegirtî |
| **dagir kirin** | îşxal kirin, vegirtin |
| **dagirtin/dadigire/dagire[I]** | 1. tijî kirin 2. îstila kirin |
| **dagirtin/dadigire/dagire[II]** | ji malperekî peldankek daxistin |
| **dahan** | dayîn *"dermanê xwestinê, dahan e" |
| **dahatin/datê/dayê** | 1. peya bûn 2. hatin xwarê 3. dagerîn |

| | |
|---|---|
| **dahatû** | 1. pêşeroj, musteqbel2. pere û berê ku ji ked an jî dezgehê mirovî tê |
| **dahelandin/ dadihêle/ dahêle** | pê ve aliqandin |
| **dahelîn/dadi hele/dahele** | pê ve aliqîn |
| **dahênan/da dihêne/dahê ne1** | . kişf kirin 2. îcad kirin 3. afirandin |
| **dahêner** | 1. kaşif 2. mûcîd 3. aferîner |
| **dahiştin/dad ihêje/dahêje 1** | . li serê rawestîn2. li serê pir kûr ramîn |
| **dahol** | def |
| **daholjen** | deflêxistî |
| **dahûrandin/ dadihûrîne/d ahûrîne** | 1. tehlîl kirin2. çareser kirin 3. jê re rayeyek dîtin |
| **daketin/dadi keve/dakeve 1** | . peya bûn 2. hatin xwarê 3. berjêr bûn 4. (sewalê nêr) nayîn, gayîn |
| **dakirin/dadi ke/dake** | 1. avêtin 2. pekandin3. nixumandin 4. berjêr kirin *"jin, mêran dadikin û radikin" |
| **da ku** | ji bo ku, seba ku*"bilind menêre, da ku tu nizm nekevî" |
| **dalak** | kesê ku zarokan sunet dike |
| **dalan** | kulek, lingor |
| **dalehî** | rexne an jî gazindên nazik |
| **dalehî kirin** | bi nazikî gazind an jî rexne kirin |
| **daliqandin/d adiliqîn/ daliqîne** | hilawestin |
| **dalît** | qurmê darê yî qutkirî |
| **daman** | ji navikê berjêrtir pêşên dêreyekî; tûman |
| **damezrandin /dadimezrîn e/ damezrîne** | 1. înşa kirin, ava kirin 2. saz kirin 3. çêkirin |

| | |
|---|---|
| **damezrîner** | 1. sazker2. çêker 3. daner 4. dahêner |
| **damilandin/ dadimilîne/ damilîne** | (çav) girtin |
| **damilîn/dadi mile/damile** | (çav) hatin girtin |
| **damûsk** | porê katara stûyê hespan |
| **dan/dide/bid e [I]** | 1. vegerandin2. radest kirin |
| **-dan ber hev** | 1. qiyas kirin2. rû bi rûyî hev kirin3. hevrû kirin *“biaqilan dan ber hev û ser hev, dînan lawên xwe zewicandin“ |
| **-dan û standin** | 1. têkilî, eleqedarî 2. kirîn û firotan3. hildan û danîn 4. bexişandin û jê birîn*"dan û sitandin di destê Xwedê de ye" |
| **-dan zanîn/dide zanîn/bide zanîn** | 1. danasîn2. pê hesandin 3. haydar kirin, agahdar kirin |
| **dan [II]** | 1. genime kutayî2. hebên gênim *"kaya kevn, dan jê nakevin" |
| **-danê kutayî** | genimê di cûnî de bi mîrkutan kutayî |
| **dan [III]** | 1. demên rojê 2. beşên zemên *"adarê, berfê xwe da guliyê darê, nema danê êvarê" |
| **danasîn** | danezan, îlan |
| **dane** | agahiya zanistî ya çespandî |
| **danezan** | teblîx, danasî |
| **-danezana mafên mirovan** | danasiya mafên însanan a gerdûnî |
| **danêr** | sazkirî, damezrîner |
| **dang** | ji şeş paran parek |
| **dange** | cihê ku sewal lê tên giyakirin; dirûngeh |
| **danisqe** | mirovê awarte |
| **danişîn [I]** | li dadgehê amadebûna pêşberî dozger |
| **danişîn/dadi nişe/danişe[I I]** | rûniştin |

| | |
|---|---|
| **daniştin/dadinişe/danişe** | rûniştin |
| **danîn/datîne/dayne** | 1. peyde kirin 2. saz kirin3. bi cih kirin |
| **danû** | genimê kutayî û kelandî |
| **danxav** | kutilkên xav |
| **dapalandin/dadipalîne/dapalîne** | 1. raparzandin2. dawerivandin |
| **dapalîn/dadipele/dapele1** | . raparzîn 2. dawerivîn |
| **daperîn/dadipere/dapere** | bi tundî lê vegerandin |
| **dapêjtin/dadipêje/dapêje1** | . çiq kirin 2. spî kirin 3. darotin 4. rûçikandin |
| **dapîr** | diya dê û bavên mirovan; pîrik |
| **dapîtin/dadipêje/dapêje** | dapêjtin |
| **daqoq** | 1. mîrkut 2. mîrkutê dêrî |
| **daqurtandin/dadiqurtîne/ daqurtîne** | di gewriyê de berjêr kirin; qurt kirin |
| **daqûl** | xwar |
| **-daqûlî tiştekî bûn** | xwarî ser tiştekî bûn |
| **dar** | 1. cureyekî hêşînahiya li ser rûyê erdê ye û mêweyan dide 2. darik*"heta ku se hêstî nekojê, dar li sêrî nakeve" |
| **dara** | hesabdariya heyiyên dûgelê; maliye |
| **daraş** | balindeyek e |
| **darayî** | têkildarî heyiyên dûgelê; malî |
| **daraz** | qerar, biryar |
| **darbest** | 1. tabûta miriyan2. çardara ku pê nexweş tên neqilkirin |
| **darbir** | cureyekî sewalên darkoj e |

| | |
|---|---|
| **darçîn** | cureyekî darên ku hem berên wê ên hişkkirî hem jî ew bi xwe tê kelandin û ava wê tê vexwarin |
| **dar de kirin /bi dar ve kirin** | 1. îdam kirin 2. hilawestin, daliqandin |
| | darêj(-e) qalibkirî, rokirî |
| **darêjk** | teşe |
| **darêjtin/dadirêje/darêje1** | . jê zêde kirin, ji ber girtin 2. li hev zêde kirin |
| **darêjxane** | karistana ku tê de bûjen di qaliban de tên ro dikin |
| **daring** | madeyê xav, bûjen |
| **darik** | parçeyeke darê biçûk |
| **-darikê miradan** | mirovê ku ji tu kesî re nabe alîkar |
| **-darikê heft argûnan** | kesê ku li her derê fesadiyê digere |
| **daristan** | komeka daran |
| **darizandin/dadirizîne/ darizîne** | mehkeme kirin |
| **darîn** | bûjena ji darê çêbûyî |
| **darkutik** | cureyekî çivîdanxav kên ku bi nikilê xwe daran qul dike |
| **darpişt** | 1. sêpiya tevnê2. piştmêr |
| **daroxa** | karmendê bacberhevkirinê |
| **dartiraş** | kesê ku ji daran pace, derî û pêdiviyên malan ên din çêdike; necar, xerat |
| **dartiraşî** | pîşeyê necariyê; xeratî |
| **das** | amureke çandiniyê ye û pê zad tê çinîn*"dasek, nikare bi dehlekê" |
| **dasî** | 1. hestiyên masiyan2. striyên di simbilan de |
| **daskêş** | kesê ku bi dasê diçine |
| **dastan** | çîrokên lehengiyê |
| **daş/daşik** | caş/caşik |
| **daşir** | destşok |
| **davek** | qawûş |

| | |
|---|---|
| **daw** | 1. pêş 2. boç, dêl*"danû xistin dawa wî, kîrê wî rabû; xistin rêza meriyan, qûna wî rabû" |
| **-dawa xwe xistin devê xwe** | pêşamadehiya revê kirin |
| **-daw û delingên xwe hilçinîn** | bi cidîtî xwe amadeyî karekî kirin |
| **dawerivandin/dadiwerivîne/ dawerivîne** | 1. raparzandin 2. baravî kirin 3. guvaştin heta ku ziwa kirin |
| **dawerivîn/dadiwerive/ dawerive** | 1. raparzîn2. baravî bûn 3. (ji ber guvaştinê) ziwa bûn |
| **dawestîn/dadiweste/daweste** | li ser piyan sekinîn |
| **daweşandin/ dadiweşîne/ daweşîne** | 1. dawerandin2. li ba kirin, ber bi ba kirin |
| **daweşîn/dadiweşe/daweşe** | 1. dawerivîn 2. ber bi ba bûn |
| **dawet** | dîlan *"daweta mîran, agirê feqîran" |
| **-ma daweta diya te ye?** | em di xemgîniyê de ne lê ev çi kêf e ku li te girtiye? |
| **dawî** | 1. axirî 2. paşî 3. encam *"berfa hûr e, dawî dûr e" |
| **-dawî lê anîn** | 1. bi encam kirin 2. kuta kirin, qedandin |
| **-dawî bi gû hatin** | di axiriya temenê xwe de karekî nerewa kirin |
| **dawîn** | tiştê li herî paşiyê |
| **dawk** | diravê ku li serê merc digirin |
| **dawpaqij** | jina binamûs |
| **dax [I]** | pêvedana bi hesinekî sincirî |
| **dax [II]** | keder, keser |

| | |
|---|---|
| **-dax kirin** | 1. bi êgir an jî hêsinê sincirî çêrm şewitandin2. xemgîn kirin*"li dû bêhna kebabê çû, rastî daxkirina lingê kerê hat" |
| **-daxê daye stuyan** | çiqas zilm heye li sêrî qewimiye û lewre serî hildaye |
| **daxbar** | bikeder, biazar |
| **daxistin/dadixîne/daxîne[I]** | 1. peya kirin 2. berjêr kirin 3. anîn xwarê 4. jê xistin |
| **daxistin/dadixîne/daxîne[II]** | (ji malperekî agahiyek) vekirin û anîn xwarê |
| **daxuyandin/dadixuyîne/daxuyîne** | 1. dan zanîn 2. eşkere kirin |
| **daxuyanî** | danezan, teblîx |
| **-daxuyaniya zelal** | danezana servekirî û eşkere |
| **daxwarin/dadixwe/daxwe** | 1. xwe jê dan aliyekî2. ser tewandin 3. avêtin dil û hinavan û eşkere nekirin *"kîso, awira masiyî danaxwe" |
| **daxwaz** | 1. xwestek 2. teleb 3. arzû |
| **daxwazname** | rûpela ku xwestekek lê tê nivîsandin û ji saziyeke fermî re tê pêşkêşkirin, erzehal |
| **dayende** | 1. kesê dayî 2. camêr |
| **dayik** | 1. jina ku zarokê tîne dinyayê 2. mak, lel*"dayikê heft kur xwedî kirine, lê heft kuran dayikek ji birçînan kuştine" |
| **dayiksalarî** | erka ku tê de dayik namzeda biryardanê ye; maderşahî |
| **dayî** | cureyekî gulan e |
| **dayîn/dide/bide [I]** | 1. lê sipartin 2. radest kirin, teslîm kirin |
| **dayîn [II]** | îkram û bexş |
| **-dayîna Xwedê** | îkram û bexşa Yezdanê Dilovan |
| **dayox** | dayende *“para dayoxan kanî ye, para xwaroxan genî ye” |
| **daz** | cureyekî aletên ku pê têl tên qutkirin |
| **de** | peyveke teşwîqkirinê ye |

| | |
|---|---|
| **-de were neteqe** | îcar were nemire û nehele |
| **debabe** | çeka giran a topavêj |
| **deban** | di şûr de cihê hesin |
| **debar** | pêdiviyên ku jiyan pê tê berdawamkirin |
| **-debara xwe kirin** | pêdiviyên jiyanê bi dest xistin/ amade kirin |
| **debax** | postkirin |
| **debaxane** | cihê postkirina sewalan; selexane |
| **debe** | koda ji tenekeyî |
| **debeng** | 1. ehmeq 2. gêj daxbar |
| **debîş** | tiştên zeliqokî |
| **debûş** | zemq, zernîx |
| **def** | alava mûsîqî ya ku her du aliyên çêrmîn in û çembera wê jî darîn e û bi dendikan tê lêxistin; dahol *"defa ber keran û çiraya ber koran, nabe qencî" |
| **-defa hewarê lê dan** | gaziyeke bi dengî kirin |
| **defik** | dahola biçûk |
| **defter** | lênûsk |
| **-deftera xêr û gunehan vebûn** | di roja qiyametê de hesabên başî û nebaşiyê jê hatin pirsîn |
| **defterdar** | karmendê ku qeyd û sicilan digire |
| **-defterdarê kerxaneyê** | serekê pêzevengan |
| **defşe** | 1. baq, deste 2. çûm |
| **degel [I]** | cesaret, wêrekî |
| **degel [II]** | qerfî, mîzahî |
| **degme** | 1. car caran 2. kêm caran |
| **degmen** | 1. bi zehmetî 2. pir kêm |
| **deh** | 1. hejmara beriya yazdehan û piştî nehan2. jimareya 10'an "çêlekeke bişîr, ji deh mihên bêşîr çêtir e" |

| | |
|---|---|
| **dehandin/di dehîne/bide hîne** | (xwarin) li xwe helandin |
| **dehbe** | jakaw, hov, kovî |
| **dehfandin/di dehfîne/bide hfîne** | 1. wêde kirin2. leqandin, livandin |
| **dehf dan** | dehfandin |
| **dehî** | 1. qurban, boraq |
| **dehl** | 1. devistan 2. baxçeyê fêkiyan *"filan kes hirçê dehlê ye" |
| **-dehl û dêş** | daristana ku bivir neketiyê |
| **dehlîz** | dalan, kulek |
| **dehta** | dehqat |
| **dehtayî** | hejmartina dehedehî(wekî 10-20-30-40...) |
| **dehş/dehşik** | cehş/cehşik*"dehşikeke mirovî jî hebe, koça mirovî li aranê namîne" |
| **dejnik** | cureyekî çêreyê ye û nepijandî tê xwarin |
| **dek** | fend û fêl |
| **-dek û dolab** | hîle û xurde |
| **dekbaz** | fêlbaz, hîlebaz |
| **delal** | 1. ezîz 2. hezkirî3. bedew *"jina nedelal, çavê mirovî diêşîne, jina delal dilê mirov diêşîne" |
| **delalî** | 1. şûm, nehs 2. berkeftî, hêja *"kes delaliya kesî, bi delalî xwedî nake" |
| **delandin/did elîne/bidelîn e1** | . li bendê hiştin2. kamsojkî kirin |
| **delav [I]** | cihê guhêztina avê *"gol dibin delav, delav dibin gol" |
| **delav [II]** | 1. kurn 2. hewz |
| **delik** | parçeyek pîneyê tenik û dermankirî yê ku didine ser birînê û pê dipêçin |
| **delikandin/di delikîne/ bidelikîne** | bi delikê birîn pêçan |
| **deling** | devê lingê şal û derpiyan ê ku digihêje gûzekan |
| **delîl** | 1. îsbat, birhan 2. wêran, dêran *"delîla baranê ba ye, delîla mirinê ta ye" |

| | |
|---|---|
| **delîn/didele/ bidele** | 1. çav li rê bûn 2. kamsojkî bûn |
| **-çav lê delîn** | çav li rê bûn |
| **delîve** | 1. firsend 2. îmkan, derfet 3. cihê derbasbûnê |
| **dem** | 1. zeman 2. wext 3. çax 4. heyam *"dema ku seg bezî gur, gur mir"-dem û destgeh 1. sazî2. kargeh |
| **-dem û destgehê** | bazirganiyê kargeha ticaretê |
| **deman [I]** | zeman |
| **deman [II]** | kirê |
| **demançe** | şeşar, cureyekî çekên lûlekin e |
| **demandar** | kirêkirî |
| **deman kirin** | kirê kirin |
| **dembihêrk** | sohbet |
| **demdemî** | 1. çaxçaxî 2. carinan û ne bi berdewamî3. ne di cih de |
| **demildest** | hema niha; derhal |
| **demîn** | carinan, degme |
| **demjimêr** | katjimêr, saet |
| **demle** | felc |
| **-demleya zarokan** | felca ku di temenê biçûk de digihêje zarokan |
| **demsal** | mewsim, werz |
| **dendik [I]** | kakil |
| **dendik [II]** | her du darikên serpopil ên ku pê def tê lêxistin |
| **dendûreşk** | dirik |
| **deng [I]** | 1. bayê ku ji pişika mirovî derdikeve û di devî de teşe digire 2. awaza ku di tevgerên xwezayê de tê bihîstin*"dengê ewran, mizgîna baranê ye" |
| **-deng û behs** | 1. xeber 2. nûçe |
| **-deng dan** | 1. navdar bûn2. lê vegerandin 3. axivîn 4. pejirandin |
| **-dengî hev kirin** | bangî hev kirin |
| **-deng kirin** | 1. axivîn, peyivîn 2. bang kirin |
| **-deng lê kirin** | 1. bang lê kirin 2. gazî kirin |

| | |
|---|---|
| **-deng vedan** | 1. olan dan2. deng vegerîn *"av dikeve cihê teng û deng vedide" |
| **deng [II]** | ramana kesê ku hildibijêre; ray |
| **-deng dan** | (di hilbijartinê de) raya xwe dan |
| **deng [III]** | hevaheng, yeksan |
| **-dengî hev bûn** | yeksanî hev bûn |
| **-dengî hev kirin** | yeksanî hev kirin |
| **dengaz** | bêdeng, kêmaxêv |
| **dengbêj** | kesê ku stranan dibêje; stranbêj |
| **dengdar** | (r) tîpa ku pêdiviya wê bi dengekî vekirî î domdar heye |
| **dengdêr** | (r) tîpa serbixwe ya ku vekirî û domdar e |
| **dengik** | gewrî, qirik |
| **dengî** | îlan |
| **dengî kirin** | îlan kirin |
| **dengîr** | navdar |
| **dengnasî** | zanistên ku pisporiya wan bizavên dengan e |
| **dengnuxêm** | alava dengbir a ku bi ser çekan ve dikin da ku dengê guleberdanê neyê bihîstin |
| **dengweş** | alava ku dengê axivgeran li derve diweşîne û bilindtir dike |
| **denk** | 1. gurzê girêdayî2. barê girêdayî |
| **dep** | darê rast î meht |
| **depreş** | textikê reş î ku nivîs li serê tên nîşandan |
| **deq [I]** | xal, şane |
| **deq [II]** | 1. metnê nivîsê2. derince, pîle 3. kapên lingan, qeydik |
| **-deq kirin** | 1. lê xal çêkirin2. ji bo balkişandinê xêz kirin 3. sox kirin |
| **deqaq** | alava hesînî ya ku bi gêrebayî tê germkirin û pê qerçûmekên kincan têne sererastkirin; wutû |
| **deqel** | xweliya hişk |
| **deqlûs** | qulopanî, teqle |
| **der [I]** | 1. derve 2. bere*"jin çav li der e, mêr xwelî li ser e" |
| **-derê ku** | biwêjeke peyitandinê ye *"derê ku filan kes jî bûye gurê devbixwîn" |
| **der [II]** | 1. cih û war 3. mekan 4. şûn û dews |

| | |
|---|---|
| **-der û dor** | hawîrdor, doralî |
| **derabe** | pergala girtinê ya deriyên firoşgehan |
| **deramet** | 1. dexl, derhat2. debara darayî 3. sewze, hêşînayî |
| **-derameta neteweyî** | dirav û dexla ku ji dûgelê re tê |
| **derandin/did erîne/biderîn e** | derxistin derve |
| **deranîn/dert îne/derîne** | ji hundir birin derve |
| **derav [I]** | kelîşo |
| **derav [II]** | 1. newal û cihokên avê 2. dertenga avê ya ku zirav e û bihur tê re asan e |
| **derav [III]** | veser, pêvek |
| **-derav kirin** | bi hev ve kirin |
| **deraxlêve** | rojên pêşîn ên biharê |
| **derazînk** | bilindeka li ber deriyan; pêderî |
| **derb** | 1. lêxistina xedar2. zede *"derban ji derblêketiyan bipirse" |
| **-derb lê ketin** | zede girtin |
| **der bar** | der heq |
| **derbas bûn** | bihurîn |
| **derbas kirin** | bihurandin |
| **derben** | cihê ku kinc tê de têne daliqandin; hilço |
| **derbend [I]** | bender, rawestgaha keştiyan |
| **derbend [II]** | tengav, xelîc, girav |
| **derbest [I]** | tiştê ku derê wî hatiye girtin û bestin; dergirtî, nixamtî |
| **-derbest kirin** | devê amanê girtin |
| **derbest [II]** | 1. cidî 2. yekser 3. Xeleq |
| **derbider** | kesê ku ji welat, mal û warê xwe dûr ketiye; aware, mişext |
| **derbider bûn** | ji mal û warê xwe dûr kevtin |
| **derbiderî** | Awaretî |
| **derbider kirin** | bi darê zorê kesek ji mal û warê wî bi dûr xistin |
| **der birin** | 1. bi lêv kirin2. îfade kirin 3. Şehitandin |

| | |
|---|---|
| **-mafê derbirinê** | heqê axaftinê |
| **der bûn** | (birîn) bijiqîn û axivîn |
| **dercaw** | destmala destan |
| **derçik** | 1. pêderî 2. hewş, hevşî |
| **derçûn** | 1. ji hundir hatin2. eşkere bûn |
| **derd** | 1. êş û azar 2. keder û xem *"dil li ser dil e, jê re nîn e tu derd û kul e" |
| | derdanik parzûn |
| **derdehinav** | êşa hinavî |
| **derdekopan** | nexweşiya ku ji ber birîneke bi hesinê zengarî de çêbûye; êşekovan |
| **derdese** | Harî |
| **derdeseyî bûn** | har bûn |
| **derdeser** | êşa serî |
| **-derdeserî bûn** | 1. (serî) di êş û belayan de bûn2. bi kul û derdan nalîn |
| **-derdeserî kirin** | 1. (serî) bi êş û belayan aciz kirin 2. (rewşa yekî) serobino kirin |
| **derdest kirin** | tewqîf kirin derav |
| **derdestname** | fermana girtina yekî |
| **derdmend** | xemgîn, keserkûr |
| **derdomerdo** | kesê ku ji ber xemgîniyê keribiye |
| **derdor** | hawîrdor, doralî |
| **derdoyî** | derdomerdo *" derdoyî pirbêj dibin, evîndar dengbêj dibin" |
| **derebeg** | kesê ku li derveyî zagonan dibe xwedî-milk û zordariyê li hejaran dike |
| **dereberjêr** | sereberjêr*"dereberjêr û hevraz, ji zimên re tunene" |
| **deredemî** | 1. bêwext, berwext 2. çaxbihurî3. Paşverû |
| **dereke** | 1. biyanî 2. Nepen |
| **deremal** | 1. şeveder 2. havî 3. Axozî |
| **dereng** | 1. ne zû 2. paşdemayî, şundemayî *"agirê kuçikan timî germ e, dereng sar dibe" |
| **dereve bûn** | (di axaftinê de) bêhemdî xwe bi ser ve bûn |
| **dereve kirin** | (bi riya axaftinê) mebesta yekî aşkera kirin |

| | |
|---|---|
| **derew** | 1. vir 2. îftira*"derew, sêwî ye" |
| **-derew kirin** | 1. vir kirin2. kuşekuş kirin |
| **derewandin/ dideriwîne/ bideriwîne** | 1. gotin betal kirin 2. rastiya gotinekê pûç derxistin |
| **derewîn/der ewker** | virek, kuşo *"derewîn, carekê dixwe firavîn" |
| **derf** | eyarê sewala gurandî |
| **derfet** | 1. îmkan 2. firsend3. Delîve |
| **dergeh** | 1. deriye ketinê2. deriyê mezin *"diz li mal e, girtina dergehî betal e" |
| **-dergeh û dîwan** | meclisa mîrî |
| **dergevan** | 1. kesê ku dêrî dipê 2. berdestiyê li pêş dêrî |
| **dergistî** | Destgirtî |
| **dergîl** | deriyê darîn |
| **dergûş** | hêlekan, landik*"bi dayikên xwedî-dergûş re herin, zû vegerin" |
| **derhatin/der tê/derbê** | (derê) derketin derve*"kî li du riyan dinêre, şaş dertê" |
| **derhêner** | Birêvebir |
| **derhûd** | berpirsiyarê ji dêla yekî ve; kefîl |
| **derhûde** | berpirsiyariya ji dêla yekî ve; kefalet |
| **derhûdname** | giroveya ku kefaletê nîşan dide; kefaletname |
| **derince** | 1. pêlik, pîle 2. Pêlekan |
| **derindêz** | 1. dêlindêz 2. merasima filehan a 14’ê sibatê |
| **derizandin/d iderizîne/ biderizîne** | 1. şikandin2. qelaştin 3. cerx kirin derizî qelişî |
| **derizîn/dider ize/biderize1** | . şikîn 2. Qelişîn |
| **derî** | 1. cihê ketina li avahiyekî2. dewsa ketina her tiştî *"golikê beş, ma li devê deriyê reş" |
| **-derî dadan** | dergeh girtin/ zirze kirin |
| **-derî kutan** | (da ku bê vekirin) li dêrî xistin *"heta ku tu deriyan nekutî, derî li ber te venabin" |

| | |
|---|---|
| **derîçe** | 1. dergehên biçûk 2. kunên biçûk |
| **-derîçeyên dil** | dergehên biçûk ên dil |
| **derîn** | dergehê derketinê |
| **derîzan** | pêşiya dêrî; pêderî |
| **derkenar** | 1. nîşeya li kêlekê; haşiye 2. têbiniya ku di pêvekê de ye |
| **derketin [I]** | cihê çûyîna ji hundir ber bi derve |
| **derketin/der dikeve/ derkeve [II]** | ji hundir ber bi derveyî çûyîn |
| **-derketin holê** | aşkera bûn |
| **der kirin [I]** | 1. derxistin2. qewirandin, cehimandin |
| **der kirin [II]** | 1. (da ku kêma birînê bikişe) qul kirin 2. (da ku mebest diyar bibin) serê karekî/ axaftinekê vekirin |
| **dermale** | sewala ku ji bo serjêkirin û firotanê tê kok-kirin |
| **dermale kirin** | (sewal) ji bo qelewbûnê xwedî kirin |
| **derman** | 1. îlac, dewa 2. çare 3. raye *"bam dibe kitan, dew dibe derman" |
| **-derman vexwarin** | îlac vexwarin |
| **dermanfiroş** | Îlacfiroş |
| **dermanxane** | cihê ku îlac lê têne firotin |
| **dernixûn** | serobinokirina aman û paçikan |
| **derpê** | 1. kinca şevê 2. kinca hundirîn û tenik a ku di bin şalan de û dema razanê tê lixwekirin*"bê derpê bigere, lê stûyê xwe li ber zaliman xwar meke" |
| **-(di) derpiyê xwe de kirin** | ji tirsan di bin xwe de rîtin |
| **derpêş kirin** | 1. anîn ber çavan 2. Angaştin |
| **dersal** | salên berê |
| **derşo** | Feraşo |
| **derûn** | nepeniyên di nava derindêz destav mirovî de, hêz û hizra navxweyî; ruhiyat, manewiyat |
| **derûnî** | ruhnasî, têkildarî ruhiyat û manewiyatê |
| **derûn-nas** | pisporê zanistên derûnî |

| | |
|---|---|
| **derûn-nasî** | pisporiya zanistên derûnî |
| **derve** | 1. ne li hundir 2. xaric *"ji derve ve mele ye, ji dil ve file ye" |
| **-derve kirin** | 1. şêlandin2. jê dizin |
| **derveyî** | 1. têkildarî tiştê ne li hundir 2. Xaricî |
| **derwêş** | 1. dîwane 2. sofî*"derwêş dizane, çi di hebana derwêş de heye" |
| **derwêşxane** | Dêş |
| **derxûn** | devnuxêma qûşxaneyê |
| **derya** | zerya, behr *"derya, bi dilopan naqede" |
| **deryavan** | zeryavan, keştîvan |
| **-Deryaya Sor** | Zeryaya Sor a di navbera Erebistan û Misirê de |
| **derz** | 1. qelîştek, qelş 2. Cerx |
| **derzî [I]** | alava dirûtinê*"bi derziyê, bîr nayê kolan" |
| **derzî [II]** | dermanê avkî yê ku bi şiringeyê tê zerk-kirin; fetrûm |
| **-derzî lê xistin** | bi şiringeyê dermanê avkî berdan bin çêrmî |
| **derzîdank** | 1. cihê ku derziya dirûtinê tê de tê çikandin2. paçika derziyê |
| **derzîreq** | mixên ku wekî derziyan e û pê kaxezan bi hev ve dikin |
| **desirman** | 1. berdestî 2. Qerwaş |
| **desirmanî kirin** | 1. berdestîtî kirin 2. ketin olam û bintînên xelqê |
| **dest** | 1. endamê ku bi ser mil ve ye û pênc tilî pê ve ne 2. lep, penc *"bi dêst bike, bi dêv bixwe" |
| **-dest bi stûyê hev re birin** | hev hembêz kirin û bi hev şa bûn |
| **-dest dan** | 1. temas kirin2. bi kêrî tiştekî hatin |
| **-dest jê berdan** | jê vegerîn |
| **-dest pê kirin** | teşebus kirin |
| **-dest tê kirin** | mudaxele kirin, tev lê bûn |
| **-dest werdan** | dest tê kirin |
| **destar** | du beraşên biçûk ên ku bi dest têne gerandin |
| **destav** | 1. mîza xalî 2. Gû |

| | |
|---|---|
| **-çûn ser destavê** | çûn destşokê |
| **destavêtin** | 1. serveçûn2. Zêdegavî |
| **destavxane** | Destşok |
| **destbelaş/destbelav** | Comerd |
| **destbelaşî/destbelavî** | Comerdî |
| **destbend** | Kelemçe |
| **destbirak** | 1. razdar 2. Kirîv |
| **destbûrî** | bêqedr, bêkêr, qedrsivik |
| **destdirêjî** | mudaxele, tecawuz |
| **deste** | 1. baq 2. lijne 3. Yekîne |
| **destek** | destyarî, alîkarî |
| **destenerm** | hevîrê ku bi rûn hatiye strandin û didine ser cihê werimî an jî eşiyayî |
| **desteng** | Xizan |
| **destexwişk** | 1. xwişka axiretê, razdara jin 2. jina ku ji kirîvgelan e |
| **destgeh** | cihê ku bûjenên danûstanê lê tên hilberîn an jî ji bo firotanê lê tên raxistin |
| **destgirtî** | dergistî, nîşanî destgoc destqop, desktop |
| **desthilatî** | 1. îqtidar 2. hukumdarî 3. serwerî4. Hêzdarî |
| **desthilatdar** | 1. hukumdar2. serwer 3. Hêzdar |
| **destik** | 1. qevd, bist 2. çembil, qulp *"destikê bivirî ne ji darê be, dar qut nabe" |
| **destî** | destik *"destiyê kêrekê û gûyê li ser bêrekê wekî hev in" |
| **destkarî** | karê ku bi destan digere; destpelingî |
| **destkeftî** | tiştê qezencbûyî û bidestketî |
| **destkêş kirin** | (hespê hefsarkirî û gemkirî) li pey xwe kaş kirin |
| **destkin** | xizan, feqîr |
| **destmal** | 1. mendîl 2. pêşgir *"serê ku neêşe, destmalê lê girêmede" |
| **destmaye** | Sermaye |
| **destmêz** | Heqdest |
| **destmiç** | bexîl û çiriz |
| **destnimêj** | paqijiya ji bo nimêjê *"pîr bidestnimêj be, sal dirêj e" |

| | |
|---|---|
| **-destnimêj girtin** | ji bo nimêjê paqijî kirin |
| **-destnimêj şikandin** | ji rewşa paqijiya ji bo nimêje derketin |
| **destnivîs** | nivîsa ku bi destan hatiye amadekirin, destxet |
| **destnîgar** | kesê ku resman xêz dike; resam |
| **destpeling** | karê ku bi keda destan hatiye hilberîn |
| **-bi destpelingî** | bi keda destê tazî |
| **destnîşan kirin** | 1. îspat kirin, aşkartin 2. Çespandin |
| **destpêk** | serê pêşîn ê her kar û çalakiyê |
| **destşok** | daşir, kîzên, qedemgeh, avrêjk |
| **destêker** | Mudaxeleker |
| **destûr** | 1. îzin 2. Musaede |
| **-destûr dan** | 1. îzin dan2. musaede kirin |
| **destûrname** | îcazetname, bawername |
| **destvala** | di dêst de tiştek tuneyî |
| **destverû kirin** | (giya û çandiniya nivîşkan) bi dest çinîn |
| **destxet** | Destnivîs |
| **destxweşî lê kirin** | jê re: "quwet be" gotin |
| **destxwişk** | 1. razdara jin2. hevala samîmî |
| **destxwîn** | Kujer |
| **destyarî** | 1. destekarî 2. Alîkarî |
| **destyaw** | deyn, qerz |
| **-destyawa alîkariyê** | qerza yarmetiyê |
| **deşenî** | kesê ku tûşî zilm û pêkutiyê hatiye |
| **deşt** | 1. rastahî, best 2. aran *"banê me yek ban e, aliyek deşt e, ê din zozan e" |
| **deştî** | 1. kesê ku li rastahiyan dijî 2. kesê ku li bajaran dijî û dernakeve zozanan |
| **dev** | endamê xwarin, vexwarin û peyivînê |
| **-dev avêtin** | 1. tê gerîn2. lê alîn 3. lê banîn |

| | |
|---|---|
| **-dev jê berdan** | têkil nebûn, dest jê vekişandin |
| **-dev şepilandin** | ji devê xwe avêtin, ji devê xwe şehitandin |
| **devarav** | kesê devgilêz û devkef |
| **devbelaş** | pirbêj, devçepel, piraxêv |
| **dever** | 1. herêm 2. mintiqe3. cîwar *"gotin: 'li wê deverê çi hebû?'; got: 'li wir jî hêştir û gur tev nediçêriyan'" |
| **deverî** | 1. herêmî 2. di qadeke teng de |
| **deverû** | xwarbûna li ser dev û çavan; sernişîv |
| **-deverûyî erdê bûn** | bi ser dev û rûyê xwe pelişîn erdê |
| **devgak** | devgem û bizmika ku di gêreyê de dikine devê dewaran da ku ji zêd nexwin |
| **devgem** | di hevsarê gemê de hesinê ku dikeve devê hespê |
| **devgenî** | kesê ku bêhna genî ji devê wî tê |
| **devgilêz** | kesê ku kef û gilêz bi devê wî dikeve; deav, devşil |
| **devistan** | cihê ku darên diriyê lê hene; devî |
| **devik** | tiştê ku pê devê firaqan tê girtin |
| **devî** | Devistan |
| **devjenî** | 1. bezînhev 2. Belapêşkarî |
| **devî** | cihê ku darên diriyê lê hene, devistan *"devî hebe dê bibe dar, xwelî li serê kesê bêwar" |
| **devîdevî** | pir li nêzikê, hema bigire li hindê ye |
| **-devîdevî lê kirin** | hema hema li hindê bûn |
| **devkî** | bi zimên û ne bi nivîskî; şefewî |
| **devjûjî** | Devlopik |
| **devlalûte** | 1. kesê ku lal û tat e 2. Zimanfisek |
| **devliken** | kesê ku daîmî ken li rûyê wî xuya dibe; rûgeş |
| **devling** | devê lingê şêl*"dil, hay ji devlingê nabe" |
| **devlopik** | kesê ku devê wî bîçûk û ber bi pêş e |
| **devmirî** | 1. bêdeng û kêmaxêv 2. acizê axaftinê û xweparastinê |
| **devnerm** | zimanşirîn, zarsivik |

| | |
|---|---|
| **devok** | axaftinên herêman; zarava |
| **devsist** | kesê ku nikare raz û bîsan veşêre |
| **dew** | 1. mastê kiyandî 2. çelqemast *"adar e, dew lidar e" |
| **-dewê xwe di parzûnê yekî de berdan** | hewl dan ku ew kes jî bibe hevparê karê wî |
| **dewa** | Derman |
| **dewar** | sewalên malê yên wekî ga û gamêşan; tarîş |
| **dewdew** | cureyekî çivîkên kedîkirî ye û axaftina însên dubare dike; tûtî dewik torteya/dûrda rûnê qijirandî |
| **dewisandin/ didewisîne/b idewisîne** | 1. mişe kirin, tepisandin 2. bi cih kirin, tê de danîn |
| **dewisîn/dide wise/bidewis e1** | . tepisîn 2. bi cih bûn |
| **dewixandin/ didewixîne/b idewixîne** | ji ser hiş birin, ji xwe ve birin |
| **dewkil/kiled ew** | 1.meşka dêw 2. Sirsûm |
| **dewlemend** | 1. sermiyandar, xwedî-rastmal 2. bi şêt û pêt *"dibêjin: 'dewlemendo pîroz be, feqîro te ji ku anî?" |
| **dewlemendî** | sermiyandarî, rastmaldarî *"heçî nizane quweta xwe, ew dûr e ji dewlemendiya xwe" |
| **dewlet** | 1. dûgel 2. sermidevistan yanî *"dewlet, di bin gurzên giyayî de ne" |
| **-dewleta nehênî** | 1. dewleta ku pergala wê ne tenik e 2. dewlemendiya ji xele-xurdeyê |
| **dewr** | 1. çax, heyam 2. careke kirina tiştekî; ger 3. raguhastin 4. wane *"heke dewr bi te re neyê, tu bi dewrê re here" |
| **-dewra xwe rewan kirin** | waneya xwe dubare kirin û baş tê gihiştin |
| **-dewrî yekî kirin** | karek raspartin yekî |
| **dewr kirin** | 1. raguhastin, neql kirin 2. xitim kirin |
| **dewran** | çerxa zemên*"dewran bi dor e, geh li jêr e geh li jor e" |

| | |
|---|---|
| **dewraze** | hespê girs |
| **dewre** | 1. xelet 2. Çewt |
| **dews** | 1. şop 2. cih 3. war 4. şûn *"dewsa şûran rehet dibe, dewsa gotinan rehet nabe" |
| **-dews û doz** | war û mebest |
| **-bi ser dews û doza yekî ve nebûn** | ji şop û armanca yekî bêxeber bûn |
| **dewx** | Sergêjî |
| **dexel** | Sextet |
| **dexelî** | Sextekarî |
| **dexes** | çavnebar, çavreş |
| **dexesî** | Çavnebarî |
| **dexisîn/dide xise/bidexise** | çavreşî lê kirin, çavnebarî kirin |
| **dexl** | zad, hubûbat |
| **deydik** | kilekursî, texterewan, qirneqos |
| **deyn** | tiştê ku heta maweyeke diyar hatiye dayîn qerz *"nanê mêran, li ser mêran deyn e" |
| **-deyn dan** | qerz dan |
| **deyn standin/kirin** | - ji kesekî destyawek wergirtin*“axa deyn dike, xulam xerc dike” |
| **-deynê xwe fît kirin** | heqê kesî li ser xwe nehiştin |
| **deyndar** | ji yekî re qerzdar*"jinê gotiye: 'bila mêrê min siwar be, bila ne deyndar be'" |
| **deyndêr** | Qerzdayî |
| **deyz** | debara zivistanê ya sewalan |
| **dezgeh** | sazî, destgeh |
| **-dezgehê agirkujiyê** | di dûgelê de saziya ku peywira wê damirandina agirên ziyandar e |
| **dezî** | bendê ziravik |
| **dê [I]** | qertafa dema bê |
| **dê [II]** | 1. dayik 2. mak 3. lel/lelik 4. dad/dadik*"hezar bavê çê, esil şîrê diyê (dê)" |
| **dêhn** | 1. bal 2. Serinc |

| | |
|---|---|
| **-dêhna xwe dan** | 1. bala xwe dan 2. lê hûr bûn |
| **dêl [I]** | 1. berdêl 2. Qîmet |
| **dêl [II]** | 1. boçik 2. Dûv |
| **-dêl hejandin** | 1. (dêlik) hatin telew 2. (jinê) gazî mêran kirin |
| **dêl [II]** | sega mê, dêlese*"dêl bi ba ye, kûçik li pey heta Bexda ye" |
| **dêleba** | heyama têkiliya zayendî ya dêl û segan |
| **dêlegur** | gura mê; makegur |
| **dêlemar** | Margîse |
| **dêlese** | Dêlik |
| **dêlik** | sega mê; dêlese *"axayî ji xulêm re got, xulêm ji segî re got, segî jî ji dêlika xwe re got" |
| **deliktî** | qûnektî û bêrûmetî dêlindêz pêşandana fermî; alayîş |
| **dêlî [I]** | gûşiyê tiriyê |
| **dêlî [II]** | cureyekî daran e |
| **dêm [I]** | erdê bêav an jî erdê ku riya avê pê nakeve |
| **dêm [II]** | sûretê rû |
| **dêman** | niştecih, xwecihî, rûniştvan |
| **dêmarî** | Jinbav |
| **dêr** | kenişt, kenîse |
| **dêran** | 1. wêran 2. belengaz û reben |
| **dêre** | Fîstan |
| **dêris kirin** | dêrz kirin |
| **dêrîn** | 1. kaw 2. mîrza 3. esîlza 4. Torin |
| **dêrz kirin** | 1. îsraf kirin2. wêran kirin |
| **dêş** | 1. êwirgeha belengazan2. her tiştê fireh 3. mûsîqaya newayên olî |
| **dêw** | ûc, teba |
| **dêwendam** | di bejna ûcan de, wekî tewayan |
| **dêze** | Esmer |
| **dêzê** | jina esmer |
| **dêzo** | mêrê esmer |
| **di** | daçekek e û wateya têdebûnê pêk tine |

| | |
|---|---|
| **-di gavê de** | di cih de, tafilê |
| **-di gel** | 1. tev de 2. tê de3. pê re |
| **-di afirê keran de razan û xewnê pêxemberan dîtin** | kambaxiya halê xwe ji bîr kirin û doza rûmetên herî berz kirin |
| **dibe ku** | îhtimalek heye ku wisa be |
| **dibetî** | îhtimal, bilanî |
| **dibistan** | 1. mekteb, xwendegeh 2. amojgeh*“dê, dibistana zarokan e” |
| **-dibistana seratayî** | dibistana asta yekemîn a6-12 saliyan |
| **-dibistana navincî** | dibistana asta duyemîn a 12-15 saliyan |
| **-dibistana amadehî** | didêl bistana asta sêyemîn a15-18/19 saliyan |
| **didu** | du *"daweta diduyan, cengecola hemûyan" |
| **difin** | 1. poz, bêfil, kepû2. nik, nikil |
| **difr/difre** | 1. xîret 2. quretî, pozbilindî |
| **dihin dan** | qedr dan, giramî dan, rêz girtin |
| **dij** | 1. hember 2. zid 3. Hevrik |
| **-li dijî sersariyê** | li hemberî bêberpirsiyariyê |
| **dijber** | muxalif, zid |
| **dijmin** | 1. neyar 2. reqîb3. hevrik *"dijminê bavê, nabe dostê lawê" |
| **dijminahî** | 1. neyartî 2. reqabet 3. Hevrikî |
| **dijraber** | zid, bereks dijûn gotina nebaş, çêr, sixêf |
| **dijwar** | 1. xeşîm 2. çetin3. zor *"dijminê dijwar, ji doste xayîn çêtir e" |
| **dijwarî** | 1. xeşîmî 2. çetinahî3. Zorî |
| **dik** | 1. cihê bûyerê, sehne2. Meydan |
| **dil** | qelb *"dil, miqabilê dil e" |
| **-ji dil û can** | 1. ji hinavan2. Samîmî |

| | |
|---|---|
| **-çargopal-avêtina dilî** | lûtkeya bicoşbûnê |
| **-dil dan** | jê hez kirin |
| **-dil hebûn** | 1. bi niyêt bûn2. talibê tiştekî bûn*"dil heye, lê taqet tuneye" |
| **-dil hênik bûn** | 1. dilgeş bûn 2. dilfireh bûn |
| **-dil kirin** | 1. xwestin 2. niyêt kirin |
| **-dil mayîn** | 1. hêvî jê şikestin2. jê êşîn |
| **dilawêr** | cesûr, wêrek |
| **dilbaz** | Cazibedar |
| **dilber** | 1. canan, yar 2. bedew 3. jina ku layiqî hezkirinê ye |
| **dilbikul** | 1. xemgîn 2. Dilbirîn |
| **dildar** | 1. aşiq 2. Sewdaser |
| **dilêr** | 1. cesûr, wêrek 2. jêhatî, jîr |
| **dilfireh** | 1. bisebr 2. Aram |
| **dilgerm** | jidil, samîmî |
| **dilgeş** | 1. rûken 2. Bicoş |
| **dilgiranî** | 1. dilşikestin 2. Hêvîşikestin |
| **dilhişk** | Dilkevir |
| **dilikî** | 1. evîndar, hezkirî, hebandî 2. aşiq 3. Sewdaser |
| **dilîn** | hîs, hest |
| **diljan** | Dilêş |
| **diljar** | 1. dilmayî 2. ji aliyê derûnî ve kesê lawaz |
| **diljarî** | rewşa lawaziya derûnî |
| **dilketî** | 1. aşiq 2. evîndar dilkutan |
| **dilkutan** | bi ser hev tepîna dilî |
| **dilmê** | 1. xav, nazik 2. hêka ku baş nehatiye pijandin |
| **dilnerm** | Ziravbihîstyar |
| **dilniya** | Dilrehet |
| **dilniya bûn** | dilrehet bûn |
| **dilniya kirin** | dilrehet kirin |
| **dilnizm** | nepozbilind û nequre |

| | |
|---|---|
| **dilodîn** | 1. têrtijî 2. Bêbiryar |
| **dilokî** | stranên evîndariyê |
| **dilop** | 1. niquteke aviyê 2. çilk *"av, dilop dilop dibe gol" |
| **-dilop kirin** | 1. niqutîn 2. Rijîn |
| **dilovan** | bişefqet û merhemet |
| **dilpak** | qenc û birûmet |
| **dilq** | 1. ser û sîçe 2. xuyabûna di şeklekî ci-hê de; lisif |
| **-ketina dilqê yekî din** | xuyabûna di lisfê yekî din de |
| **dilrast** | 1. sadiq 2. muxlis dilrehet kesê kubêxem û bêkeser e |
| **dilrehetî** | Dilaramî |
| **dilsar** | 1. bizdonek 2. betilî 3. Nexwestî |
| **dilsaz** | Qelbavakirî |
| **dilsoz** | kesê ku li ser sozê xwe dimîne; sadiq |
| **dilşa** | rûgeş, dilgeş |
| **dilşikên** | Qelbşikên |
| **dilteng** | 1. bêsebr, netebitî2. Bêtehemul |
| **diltenik** | 1. ziravbihîstyar2. Qîjgiriyok |
| **diltepîn** | qelbjenî, dilkutan |
| **diltezîn** | 1. derdnak 2. biazar, biêş |
| **dilwestîn** | mirina ji ber sekinîna qelbî |
| **dilxwaz** | 1. xwestî, heweskar2. Mereqdar |
| **dilxelîn** | Cirnexweşî |
| **dilxerab** | gumanbar, şikbar |
| **dilxerabî** | şikbariya dilî |
| **dilxereng** | şewata dilî |
| **dilxweş** | razî, pejirandî |
| **-dilxweş bûn** | pê re kêfa xwe anîn/kêfxweş bûn |
| **dilxweşî** | bi xwestinî |
| **dimatî** | 1. rûniştî 2. niştecih, dêman |
| **dimis** | Doşav |
| **dimşînk** | şewba çivîkan, qira mirîşkan |

| | |
|---|---|
| **din** | ne ev ne jî ew, dîtir |
| **-roja din** | roja dîtir dindil nazik, nazdar |
| **dindilandin/ didindilîne/bidindilîne** | nazdar kirin |
| **dindilandî** | 1. baş sexbêrkirî2. pir nazenîn |
| **ding** | 1. dîwarê mezin û qayîm 2. dengê ku dema lêxistinê ji tiştê hundirvala tê |
| **dengeding** | dengê domdar ê ku dema lêxistinê ji tiştê hundirvala tê |
| **dinya** | 1. cîhan 2. alem*"gotine: 'te dinya çawa dît?' gotiye: 'li gorî dilê xwe' " |
| **dinyanedîtî** | 1. nedîtek2. serobero 3. Laylac |
| **dir** | 1. segê gurêx; gurxenêq2. gir *"cewrikên seyê dir, timî dir in" |
| **diran** | hestiyên cûtinê yên di devan de *"cîranê nebaş bihêle, diranê êşiyayî bikêşe" |
| **-diranên kursî** | diranên paşiyê yên cûtinê |
| **-diran qirqiçandin** | lê gef xwarin, tehdîd kirin |
| **diran di enîşkê de bûn** | pir qeleş û xedar bûn |
| **dirandin/didirîne/bidirîne 1** | . çirandin 2. Qelaştin |
| **diranqîç** | Diranbeş |
| **diransaz** | bijîşkê ku pisporiya wî dev û diran in |
| **dirav** | pereyê kaxez û madenî*"aqil, bi diravan nayê piştê" |
| **diravname** | 1. derameta dûgelê 2. berhevoka rojane, heftane an jî mehane ya ku diravên mezaxtî û hatî tê de tên tomarkirin |
| **dirc** | qalikên deryayî |
| **direfş** | 1. nîşane 2. nîşaneya yekîneyeke leşkerî |
| **dirêj** | 1. zêde 2. bilind, berz 3. vît, çik |
| **dirêjahî** | 1. zêdehî 2. bilindahî, berzî *"aqil ne li seriyan e, ne jî li dirêjahiya çongan e" |
| **-dirêjahiya salê** | seranserî salê giştî |
| **dirêj bûn** | 1. berz bûn, bilind bûn 2. bejn avêtin |

| | |
|---|---|
| **dirêjî pê dan** | domandin, berdewam kirin |
| **dirêj kirin** | 1. bilind kirin, berz kirin 2. bi ser ve zêde kirin |
| **dirêş** | alaveke devtûj a solbendan e û destiyê wê darîn e *"bi kulmê meçe ser dirêşê" |
| **dirh** | nîşane, mohr |
| **dirik [I]** | 1. dareke pîjpîjî ye û berên wê tên xwarin2. pîj, strî *"mirov di bin siya dirikê de ranakeve, di bin siya spingdarê de radikeve" |
| **dirik [II] û virik** | galegala vala û bêkêr |
| **dirikandin/di dirikîne/ bidirikîne** | rast dêrandin, piştrast kirin |
| **dirinc** | tewayê efsûnî; şeydirinc tanqûnî |
| **dirinde** | hov, kovî, jakaw |
| **dirixandin/di dirixîne/ bidirixîne** | Bexişandin |
| **dirî [I]** | Strî |
| **dirî [II]** | cureyekî darên bistrî ye |
| **dirîn/didire/ bidire** | 1. çirîn 2. qelişîn *"beq nequre, dê bidire" |
| **dirîreşk** | mêweyek e |
| **dirm** | bijok, berbelav |
| **-nexweşiya dirmdar** | nexweşiya ku belav dibe |
| **diroz** | Dua |
| **dirozge** | Dua |
| **diroz kirin** | dua kirin |
| **dirûd** | 1. silavên pîroz 2. silavên pêxember û çakan3. Silav |
| **dirûş** | binê piyî |
| **dirûşm** | peyv û hevokên ku di xwepêşandanekê de tên berzkirin |
| **dirûn(dirûtin)/didirû/ bidirû** | 1. (kinc) kêl kirin2. (giya û zad) çinîn |
| **dirûnge** | qada ku pez lê tê giyakirin |

| | |
|---|---|
| **dirûv [I]** | 1. rû û sîma 2. bere 3. dîmen 4. rûçik, sikûm 5. Teşe |
| **dirûv [II]** | 1. nîşane 2. nîşaneya ku li sewalan didin da ku pê bên naskirin |
| **-dirûv pê ketin** | Şibihîn |
| **dist** | Qûşxane |
| **diş** | xwişkên bûk û zavê |
| **divêle** | bendikên çêrmîn |
| **diwaroj** | pêşeroj, ayende |
| **di xwe re dîtin** | 1. canazarî nekirin 2. xwe ragirtin3. pê karîn |
| **diyanet** | kar û barên têkildarî ola mirovî |
| **diyar** | 1. kifş û eşkere 2. eyan û beyan li hole |
| **-diyarî çavan bûn** | 1. bi ber çavan ketin 2. eşkere bûn 3. xuya bûn |
| **diyarde** | 1. kifşbûyî 2. eşkerebûyî3. li xuyanê |
| **diyarî** | 1. xelat 2. Bexşîş |
| **-diyarî kirin** | 1. bexişandin2. xelat kirin |
| **diyarker** | Eşkerekirî |
| **diyar kirin** | 1. xuya kirin2. dan zanîn |
| **diz** | heramî, çilfis *"dizê malê ji malê be, ga di kulekê re derdikeve" |
| **-bûn dizê Xwedê** | bi rewşa xwe qayîl nebûn û pozbilindî kirin |
| **dizek** | heramxur, çilfis*"dizekî ji dizekan dizî, erd û ezman lêrizî" |
| **dizgîn** | 1. gem 2. serê gemê yî ku bi destan tê girtin |
| **-dizgîna xwe qetandin1** | . ji hefsêr filitîn 2. serfiraz bûn |
| **-dizgîn kirin** | 1. serî gem kirin 2. zeft kirin |
| **-dizgîn kişandin** | peyatî çûn û hespê gemkirî li pey xwe kaş kirin |
| **dizî** | heramîtî, çilfisî *"tu carî destê diziyê nasitire" |
| **dizîn/didize/ bidize** | bêyî haya xwediyanji malê wan hildan; çilfisandin*"ber kerê re derbas dibe û cehşike jê didize" |
| **dizîka** | bêhay, bêxeber |
| **divê/divêt** | Pêwist |

| | |
|---|---|
| **divetî** | pewîstî, hewcetî |
| **dîbace** | Pêşgotin |
| **dîber kirin** | 1. rave kirin2. şîrove kirin |
| **dîdar** | 1. hevdîtin 2. Sohbet |
| **dîdarî** | Dîtbarî |
| **dîdem** | Dîmen |
| **dîdevan** | Çavdêr |
| **dîdevanî** | Çavdêrî |
| **dîdexane** | Çavdêrxane |
| **dîk** | nêrê mirîşkê; keleşêr*"dîk jî namûsa xwe dizane" |
| **dîkilok** | stêrka tifingê |
| **dîl** | 1. hêsîr 2. Bengî |
| **-dîl girtin** | 1. hêsîr kirin2. bengî kirin |
| **dîlan** | 1. dawet 2. şahî*"derdê feqîrî nan e, derdê axayî kêf û dîlan e" |
| **dîlbazî kirin** | bi zarê xweş xwe dan hezkirin |
| **dîlok** | kilama govendê |
| **dîmen** | 1. dirûv 2. Menzere |
| **dîmendêr** | amûra ku wêne û dîmenan bi riya pêlên gêrebayî û peykê radihîne temaşevanan |
| **dîmenguhêz** | amûra ku dîmenan bi zindî radigihîne |
| **dîmenkirêt** | kesê ku tu meymenet di rûyê wî de tuneye |
| **dîn [I]** | 1. ol 2. ola îslamê*"ji bo xatirê xatiran, mirov diçe ser dînê kafiran" |
| **dîn [II]** | 1. cinî 2. bêhiş*"aşê dînan, bê av digere" |
| **-dîn û har** | bêaqil û hişaloz*"siwar siwar e, li siya xwe guhdar e, li nava sêrî mexe dîn û har e" |
| **-dîn bûn** | 1. cin pê ketin2. hişaloz bûn |
| **-dîn kirin** | 1. bêhiş kirin2. Behicandin |
| **dînar** | 1. diravê zêrînî yê dewra dewlata îslamî 2. diravê hin dewletên ereban ên nûjen *"li malê tune dînarek, navê keçikê Hezare" |
| **dînik** | 1. aqilsivik 2. kêmaqil*"bihur, bi dînikan sax nabe" |
| **dînok** | dînik *"dînok di şîn û şahiyan de kifş dibin" |
| **dînsist** | kesê ku di erkên dînî de sistiyê dike |

| | |
|---|---|
| **dînxane** | nexweşxaneya dînan; şêtxane |
| **dîq kirin** | 1. nihêrtin 2. ser dan |
| **dîqet** | Baldarî |
| **dîqet kirin** | bi baldarî li serê rawestîn |
| **dîrok** | dûrok, tarîx |
| **-dîroka hevbeş** | tarîxa muşterek a çend aliyên têkildar |
| **dîroknas** | Tarîxzan |
| **dîsa** | cardin *"hîv çiqasî bedew be, dîsa jî qusûreke wê heye" |
| **dîsk** | du darikên bi destikê bangurdanî ve ne û dikevin her du çalikên seriyan |
| **dîtbar** | tiştê ku bi çavan tê dîtin dîtbarî tiştê ku bi çavan tê temaşekirin |
| **-hunerên dîtbarî** | hunerên ku xîtabî temaşekirinê dikin |
| **dîtin [I]** | fikr û raman |
| **-bi ditina min** | bi nêrîna min |
| **dîtin/dibîne/ bibîne[II]** | 1. nihêrîn 2. temaşe kirin 3. pêrgî hatin*"dît ez im, nedît diz im" |
| **dîtinî** | ramana sêwirandî |
| **dîtir** | 1. a din 2. Wêdetir |
| **dîwan** | 1. meclisa mêvanan2. berhema helbestvên3. birek mirov4. cureyekî rûniştekên ku çend kes li serê dikarin rûnin *"bê şêx û pîr, meçe dîwana mîr, da ku nekevî temtêla feqîr" |
| **dîwane** | 1. derwêşê aşiq2. Gêj |
| **dîwanxane** | koçika mêvanan |
| **dîwar** | sûr *"ba, li dîwarê derve dixe" |
| **-dîwarê parastinê** | di malperê de pergala ewlehiyê |
| **-dîwarê ewlehiyê** | di herêmên aloz de berbendên ewlekariyê |
| **-dîwar lê kirin** | sûr jenîn |
| **dîz/duz [I]** | Keleh |
| **dîz/dîzik [II]** | amana ji gil*"gûzek gûzek, dibe dîzek" |

| | |
|---|---|
| **-dîzika devgirtî** | 1. kesê ku bi razên xwe ve dijî2. kesê ku ramana xwe ya rasteqîn vedişêre |
| **dobe [I]** | 1. hingivê zelal ê ku ji şaneyan cuda dibe2. dilopeke şirîniya zer a ku ji hêjîran tê xwarê |
| **dobe [II]** | Kelek |
| **dobelan** | kariyek e |
| **doç** | Boç |
| **doçka** | cureyekî guleyên ku ji topan biçûktir e |
| **dojeder** | 1. pizrik 2. dînsist birîn |
| **dojeh** | cehenem *"heta ku tu dojehê nebînî, bihişt bi te xweş nabe" |
| **dol** | 1. deşt 2. best, rastahî3. Newal |
| **dolan** | 1. dehlîz 2. hewşa bihurtinê |
| **dolav** | toterîka ku satila bîra avê dadixe û hevraz dike |
| **doliv** | 1. îdare, rêvebirî2. Karîgerî |
| **dolivger** | Rêvebir |
| **dolivgerî** | Rêvebirtî |
| **dolmend** | Zengîn |
| **dolmendî** | Zengîntî |
| **doman** | pêvajo, demajo |
| **domandin/didomîne/bidomîne** | 1. berdewam kirin 2. jiyandin *"dinya siya darê ye, ji kesî re nadomîne" |
| **domdar** | Daîmî |
| **domîn/dido me/bidome1** | . berdewam bûn 2. Kêşan |
| **don** | 1. bez û zon 2. zêt3. bizir *"don nekî çirayê, çira ronahiyê nade" |
| **-donê yekî cardin di serê wî dan** | hewl dan ku pîşeya yekî cardin hînî wî bikin |
| **doq/doqik** | şiv, ço |
| **dor** | 1. hawîr 2. şîştir3. rêz *"Xanika Xido, yek nebû, dora dido" |
| **-dor hatin** | çax hatin |
| **-dor lê girtin** | 1. rapêçan2. derdest kirin |
| **doraleyn** | Hawîrdor |

| | |
|---|---|
| **dorav** | 1. (ji ber bandora kêşeya roj û heyvê) rabûn û daketina seviyeya ava deryayan 2. med û cezr |
| **dorgirtî** | tiştê ku dora wî hatiye rapêçan |
| **dorhêl** | 1. hawîr 2. Çarçive |
| **dormandor** | bi berfirehî |
| **dornas** | 1. hawîrnas 2. pispor *"dorê bide dornasan" |
| **dorpêç kirin** | 1. rapêçan2. pişt jê standin 3. xeneq lê şidandin |
| **dost** | 1. hogir 2. razdar*"dijminê dijminê mirovî, dostê mirovî ye" |
| **dostanî** | 1. hogirtî 2. razdarî*"dostaniya dostê xwe berde, lê dostaniya dostê bavê xwe bermede" |
| **doş kirin** | ker û hesp dan sekinandin |
| **doşanî** | sewalên dotinê |
| **doşav** | Dimis |
| **doşavmij** | tiliya şehadetê |
| **dot** | keç, qîz |
| **dotmam** | keça apê mirovî, |
| **dotmîr** | 1. keça mîr 2. keybanû *"bi qîzanî dotmîr bû, bi jinanî pîr bû" |
| **dotin/didoşe /bidoşe** | ji guhanan şîr hildan *"şîr |
| **dote** | seradê, bêjing da binî" |
| **dotir** | 1. a din 2. a piştî wê |
| **-dotira rojê** | 1. roja din2. roja piştî wê |
| **dox [I]** | bela û musîbet |
| **dox [II]** | rewşa xayîziyê |
| **dox [III]** | destiyê alavan |
| **dox çûn** | xayîz bûn |
| **doxîn** | pêgirêdana şal û derpêyî |
| **-doxîn ketin stûyan** | tolaziya wî ya veşartî eşkere bûn û pey re riswa bûn |
| **doxînsist** | 1. tolazê bişehwet2. mubtelayê şehwetê |
| **doz** | 1. daxwaz 2. têkoşîn3. Armanc |
| **dozdar** | kesê ku daxwazekê an jî gazindekê pêşkêşî aliyên têkildar dike |
| **dozger** | di dadgehê de kesê ku li tawanê dikole |

| | |
|---|---|
| **dozîn** | paldêr, ajo |
| **du** | 1. hejmara pişti yekan û beriya sisiyan 2. jimareya2'yan *"du hesp, li ser afirekî nabin" |
| **dua** | niyaza xêr û qenciyê |
| **dua kirin** | niyaza xêr û qenciyê kirin *”neyar, ji neyaran re dua nakin” |
| **dubare kirin** | ducar kirin |
| **dubendî** | 1. îxtilaf, tezad2. Nakokî |
| **ducan** | hamile, duhalî |
| **-ducanî bûn** | hamile bûn, duhalî bûn |
| **duçerxe** | alavake raguhastinê ya dutayeyî ye |
| **dudev** | devçeqel *"kulfet şûrê dudev e li pişta mêr" |
| **dudil** | bêbiryar, bêqerar |
| **dugîsin** | kirin gotin dubare kirin |
| **duh** | roja borî, beriya îro |
| **duhêl** | 1. bendê çermîn2. Dualî |
| **dujang** | elameta nexweşiyê, qitîtk |
| **dukak** | zad, dexl |
| **dukar** | riwayet, salix |
| **dulger** | Hesingêr |
| **dulgerî** | Hesingêrî |
| **dumbe** | 1. qelew 2. kok3. Ziktêrdek |
| **dunde** | 1. nifş 2. Zuriyet |
| **dunex** | tayê ku ji du bendan hatiye rêstin |
| **dunikilî** | cureyekî çivîkên serpopil e |
| **dupat** | Ducar |
| **dupate** | tiştê ku du caran hatiye kirin; tekrar |
| **dupat kirin** | dubare kirin |
| **durist** | 1. di rasteriyê de 2. neçewt 3. biserinc *"dûr here, lê durist here" |
| **-durist kirin** | 1. çêkirin2. pêk anîn |
| **durû** | 1. munafiq 2. Riyakar |
| **durûtî** | 1. munafiqtî 2. Riyakarî |
| **duryan** | cihê averêbûnê |

| | |
|---|---|
| **dusaxe** | Girtîxane |
| **dusibe** | piştî du rojan |
| **duşaxe** | cureyekî nexweşiyan e |
| **duşem** | roja sêyemîn a hefteyê |
| **duşîze** | 1. bakire, xama2. Destpêneketî |
| **duta** | Duqat |
| **duta kirin** | duqat kirin |
| **dutayî kirin** | dunexî rîs rêstin |
| **duxaskan** | jina ku zarok aniye û di kincan de ye |
| **duxaskanî** | rewşa jina ku welidiye |
| **duyem(-în)** | di rêza diduyan de |
| **dû [I]** | 1. pişt 2. piştî wî/wê 3. Pey |
| **-li dû heyfê ketin** | doza tolhildanê şopandin |
| **-li dû xwe kaş kirin** | bi kotekî li pey xwe birin |
| **-dû re dû** | re pir şunde, paşê dereng |
| **dû [II]** | 1. mij û moran2. dûxan *"kulek xwar e, dû rast e" |
| **dûajo** | 1. şivanê ku alikariya serşivên dike 2. di karekî de kesê alîkar |
| **dûbrang** | teyrê nêçîrê |
| **dûdik** | Fîq |
| **dûdo** | 1. kevirê girover ê ku her lîstikvan hoçikê xwe davêjê 2. Hedef |
| **dûkel** | 1. bixar 2. hilm û gilm |
| **dûkelkêş** | bixêrî, rojing |
| **dûm [I]** | berdewamî û dûmahî*"dûma her tiştî heye, lê ya zilmê tuneye" |
| **-dûma dirêj** | kar û barên temendirêj |
| **dûm [II]** | boç û terî |
| **dûmahî** | Dewam |
| **dûman** | dûxana ku bi ser êgir dikeve *"gur li dûmanê digere" |
| **dûmir** | 1. ko 2. Kordûnde |
| **dûng** | dûvê pezê ku ne dêlse ye *"kitikên zemên, dûngên qelew dixwin" |

| | |
|---|---|
| **dûpişk** | cureyekî sewalên jehrdar e *"destê xwe mexe her kunê, di hinan de mar hene û di hinan de dûpişk" |
| **dûr** | 1. ne li nêzîkê 2. veqetî*"dûro, bi nûro" |
| **-dûrî aqilan bûn** | derî mantiqan bûn |
| **-dûrî canê we** | Xwedê neke ku li we biqewime |
| **-dûrî huzûra haziran** | haşa ji huzûra cenabê we |
| **dûrahî** | 1. nenezîkahî 2. Veqetîn |
| **dûrd** | arava ku dadirive binê tiştê avî; torte |
| **dûrebîn** | 1. xwedîferaset2. alava ku dûriyê nezîk nîşan dide *"avên qûnan, niha jî xwe dane ber dûrebînan" |
| **dûredest** | 1. neberbelav2. ne li ber destan |
| **dûrendîşî** | Feraset |
| **dûrî** | Durahî |
| **dûş** | 1. sewiye, ast 2. rêz, şîştir 3. Îstiqamet |
| **dûv** | boçik, dêl |
| **dûvedirêj** | 1. sewala ku boçika wê dirêj e 2. tiştê ku di demeke dereng û nenêzîk de diqede |
| **dûvelang** | 1. alava ku ji heyvê weşanê dişîne dinyayê, peyk 2. olamdarê berjewendiyên xelqê |
| **dûvelangtî** | olamdariya berjewendiyên xelqê |
| **dûvhej** | 1. dêlhej 2. Qûnek |
| **dûvhejî** | 1. dêlhejî 2. Qûnektî |
| **dûvhejî kirin** | 1. dêlhejî kirin 2. qûnektî kirin |
| **dûvmesas** | Bilbil |
| **dûvre** | 1. piştre 2. Paşê |
| **dûvstêrk** | stêrka biboçik dûxan mija ku ji êgir quloz dibe |

# E

| | |
|---|---|
| **e/E** | tîpa şeşemîn a alfabeya kurdî ye; dengdêreke dirêj e, cîderka wê pêşderkî ye, di belavbûna wê de dev vekirî ye û asta belavbûna wê nizm e e erê |
| **ebeboz** | 1. mêrxasok 2. şeşerût 3. pêxas, çeqrût |
| **ebebozî** | 1. mêrxasokî2. şeşerûtî 3. pêxasî, çeqrûtî |
| **ebedî** | 1. bêpayan 2. heta hetayê 3. sermedî*"ebed û ebedî, her tişt vedigere li xwedî" |
| **ebesor** | 1. bijarte 2. Ader |
| **ebesorî** | 1. bijartetî 2. Aderî |
| **ebrû** | 1. birû 2. birûyên kevankî |
| **ebter** | 1. kêm û netemam2. bêtov û bêker 3. sergêj û dîn |
| **ebterxane** | nexweşxaneya kêmaqilan |
| **ecacok** | firtonek, bahoz*"para xeydokan, çû ber ecacokan" |
| **ecel** | 1. dema mirinê 2. mirin *"ecel ku bê, nade mecal" |
| **ecem** | tirkê azerî |
| **ecemî** | 1. zimanê tirkên azerî 2. tor, cahil |
| **ecemîtî** | torî, cahilî |
| **ecêb** | 1. xerib, seyr 2. nedîtî û nebînayî |
| **-ecêb man** | 1. mat man2. şaşwaz bûn |
| **ecêblosik** | kesê ku wisa guheriye ku nayê nasîn |
| **ecibandin/di ecibîne/ biecibîne** | 1.pê re kêfxweş bûn 2. jê razî bûn*"ê ku dotmama xwe |
| **neecibîne** | , dê kordûnde bimîne" |
| **ecîn** | kutilkên xav |
| **eç** | (di zimanê zarokan de) lêxistin |
| **eç kirin** | (di zimanê zarokan de) lê xistin |
| **edeb** | ar, şerm |
| **edebiyat** | navê giştî yê hemî tiştên devkî û nivîskî ên hunermendî, zanistî û pîşeyî ye; wêje, tore |

| | |
|---|---|
| **-edebiyata bedew** | navê giştî yê hemî hunerên devkî û nivîskî yên ku helbest, roman, şano, çîrok û hwd dikevine ber; wêjeya bedew |
| **-edebiyata pîşeyî** | navê giştî yê nivîsarên zanistî(bijîşkî, endazyarî…) û yên mesleki/pîşeyî ye; wêjeya pîşeyî |
| **edene** | eware û yax |
| **edilandin/dicedilîne/biedilîne**1 | . bi cih kirin 2. dewisandin 3. civandin*"berê biedilîne, paşê bixemilîne" |
| **edilîn/diedile/biedile**1 | . bi cih bûn 2. dewisîn3. civîn û çêbûn |
| **eded** | Hejmar |
| **edese** | alava ku tiştên biçûk mezin dide xuyan |
| **eê** | (di zimanê zarokan de) gû |
| **eê kirin** | (di zimanê zarokan de) rîtin |
| **efare** | bermaya mêwe û zadan |
| **efsene** | serhevde û beredayî |
| **efsûn** | sîhir, cadû |
| **efsûnbaz** | Cadûbaz |
| **efûng** | Afnik |
| **efûngî** | Afnikî |
| **efûngî bûn** | afnikî bûn |
| **egal** | Şaşik |
| **eger** | 1. sedem 2. Heke |
| **egîd** | wêrek, cesûr |
| **egîdî** | wêrekî, cesûrtî |
| **egle** | 1. derengî 2. Biliyan |
| **egle bûn** | 1. bi derengiyê ketin 2. pê bilîn |
| **egle kirin** | 1. bi derengiyê xistin 2. pê bilandin |
| **ehlibeyt** | malbata cenabê Pêxember eleyhiselam |
| **ehlikitab** | 1. endamên olên îlahî 2. file û cihû |
| **ehmeq** | 1. bodele 2. gêjik3. Xêvik |
| **ehmeqî** | 1. bodeletî 2. sergêjî 3. xêviktî *"mêrxasiya zêde, ehmeqî ye" |
| **ejdeha** | 1. ziya 2. marê çîrokî yê ku ji dev û çavên wî holepîtên êgir davêjin |

| | |
|---|---|
| **ejnû** | Çong |
| **ek** | Eê |
| **elaf** | bazirganê ku zadî dikire û difiroşe |
| **elamet** | 1. berate 2. nîşane3. Şop |
| **-elameta xêrê** | nîşaneya başiyê |
| **elb** | 1. satil 2. kod *"bi elba mezin, mede xelqê" |
| **elbik** | elba biçûk |
| **elende** | Eland |
| **elenî** | eşkere û bêminet |
| **eleqe** | Têkilî |
| **eleqedar** | Têkildar |
| **eletewş** | 1. beletewş 2. gotin, kirin û biryara bêawa û bêarmanc |
| **elimandin/dielimîne/bielimîne** | 1. hîn kirin, fêr kirin 2. amojandin3. perwerde kirin |
| **elimîn/dielime/bielime**1 | . hîn bûn, fêr bûn 2. amojîn 3. perwerde bûn*"devê ku elimiye viran, vala nasekine" |
| **elind** | Spêde |
| **elîl** | nesax, nexweş |
| **elmas** | kevirekî giranbiha ye |
| **elok/elelok** | sewaleke bibask a malê ye |
| **em** | (r) cinavkeke pirjimariyê ye |
| **emad** | 1. daxwaz 2. Vîn |
| **emadî** | li gorî daxwaz û viyanê |
| **embar** | 1. binanî 2. mexzena kel û melan |
| **embaz** | mînak, nimûne |
| **emîlok** | lawazbûna ji ber îshala demdirêj |
| **emîlokî** | kesê ku ji ber nexweşiya hundirêşê pir lawaz bûye |
| **emr [I]** | temen, jî *"emrê ku çû, mede dû" |
| **emr [II]** | 1. ferman 2. Rêzik |
| **enber** | bêhneke xweşik e |
| **enbar** | 1. binaniya malan2. mexzen *"enbara cotkaran, di serê gîsinê wan de ye” |

| | |
|---|---|
| **encam** | 1. netîce, akam 2. dawî, aqibet |
| **-encam dan** | 1. netîce jê wergirtin 2. bi dawî bûn |
| **encamname** | daxuyaniya dawiyê |
| **end** | Qeys |
| **endam** | Namzed |
| **-endamê saziyê** | namzedê mueseseyê |
| **endaze** | 1. zanistên qeys û pîvanê; hendese 2. qeys û pîvan 3. Usûl |
| **endazyar** | pisporê zanistên pîvan û qeysê; muhendis |
| **endelmendel ketî** | hizhizî, hophopo |
| **engizandin/diengizîne/biengizîne** | 1. tehrîk kirin2. teşwîq kirin |
| **engizîn/diengize/biengize** 1 | . danexwarin 2. Niçîn |
| **enirandin/dienirîne/bienirîne** | bi hêrs kirin |
| **enirîn/dienire/bienire** | bihêrs bûn |
| **enî** | rû, bere |
| **enîroj** | kesê ku eniya wî rewneqdar e |
| **enîşk** | herewera ku di navenda mil de ye |
| **entere** | roja ku sermaya zivistanê dest pê dike*"entere, dikuje ga û ker e, xudan hê jî bêxeber e" |
| **e-peyam** | peyam û nameyên bi riya tora ragihandinê ya navneteweyî |
| **ep/epik** | xwarina zarokan |
| **ep kirin** | (di zimanê zarokan de) xwarin û vexwarin |
| **eqd [I]** | dîwarê ku ji xweliyê hatiye lêkirin |
| **eqd [II]** | peyman û lihevkirin |
| **-eqda zewacê** | lihevkirin û îlankirina mehra rewa |
| **eqîm** | Stewr |

| | |
|---|---|
| **eraf/erah** | 1. pispor 2. arxeyîn û bêminet 3. bi xwe ve ewle |
| **eraq** | şerab, mey |
| **erbane** | Defik |
| **erd** | 1. rûyê zêvînê 2. dews 3. şûn 4. aqar*"baran dibare, erd xwe dipesinîne" |
| **erdhej** | hejek, zelzele |
| **erdnas** | pisporê ku li erdê dikole û lêkolînên xwe bi awayekî zanistî dike |
| **erdnasî** | pisporiya zanistî ya ku mijara wê tevgera erdê ye |
| **erebe** | seyare, çarçerxe |
| **erebane** | Nasirge |
| **erê** | belê *"erê erê ye, na jî naye, lê erê-na bela ye" |
| **erik** | na lo/na lê! |
| **erjeng** | tirsnak, sehmdar |
| **erk** | 1. vatinî, peywir 2. Wezîfe |
| **-erkên dîrokî** | peywirên tarîxî |
| **erkbeşî** | 1. karbeşî 2. Peywirbeşî |
| **erşanî** | Pîkol |
| **erşan kirin** | (sewal) erd pîkol kirin |
| **erşêt** | heşteka pare |
| **erwend** | 1.jîr, zana, aqil2. ciwan, xweşik |
| **erxewan** | rengê keskê tarî |
| **erzan** | 1. kêmbiha 2. kêmqedr *"erzan kirî, heban dirî" |
| **erzan bûn** | 1. kêmbiha bûn 2. kêmqedr bûn |
| **erzanî** | Kêmbihatî |
| **erzan kirin** | 1. (biha) daxistin2. (qedr) xistin |
| **erzaq** | pediviyên xwarinê |
| **erzêl** | malika ku ji çiqilên daran tê çêkirin û li ser çar singan ava dibe |
| **erzên** | hestiye binê dêv |
| **esas** | bingeh *"avahî nabe bê esas, mirov bi rojî û nimêjê nabe xilas" |
| **esîl** | ader, esîlza *"ji esîlî bipirse, ji bêeslî bitirse" |
| **eskênc** | jan, şkênc |
| **esl** | 1. bingeh 2. jêderk3. nifş *"esl, winda nabe" |
| **esman** | barekê li ser erdê yê bê ser û ber |

| | |
|---|---|
| **-esmanê devî** | arîkê dêv |
| **esmanger** | pisporê ku ji bo karên zanistî bi firokeyan li esmanan digere |
| **esmangerî** | karê ku es manger pê radibe |
| **esmer** | Qemer |
| **esrar** | poranga xaşxaşkan a sermestker |
| **esrarkêş** | bengiyê poranga xaşxaşkan a sermestker |
| **eşîr** | qebîle, hoz |
| **eşîrtî** | pergala hozdariyê |
| **eşkere** | 1. xuya, diyar 2. kifş, berbiçav *"agirê bidû, eşkere ye" |
| **eşkere bûn** | 1. xuya bûn, diyar bûn 2. kişf bûn, berbiçav bûn |
| **eşkere kirin** | 1. xuya kirin, diyar kirin 2. kişf kirin, berbiçav kirin |
| **eşkeretî** | 1. serbestî 2. Berbiçavî |
| **eşkêl** | 1. tehr, awa 2. çepera ku çav dibîne |
| **-eşkêla erdê** | dirêjahiya ku ji navenda kadê heta cihekî li rûyê erdê |
| **eşq** | 1. evîn 2. sewdaserî*"eşqa dizan, bi şevereşê geş dibe" |
| **eşûra** | di salnameya hicrî de dehê meha muheremê |
| **et** | xwişka mezin |
| **etar** | Hûrdefiroş |
| **etehiyat** | di nimêjê de duaya ku di rûniştinan de tê xwendin *"etehiyato, çawa lê hato" |
| **etirîn/dietire /bietire** | 1. bêrî kirin, bende man 2. meraq kirin *"sêwî sitirî, melek etirî" |
| **etê** | awayê bangkirinê yî xwişka mezin |
| **etore** | Hop |
| **etûne** | Kilsxane |
| **ev** | (r) cînavka şanîdanê ya ji bo kesê nêzîk |
| **-ev çend** | bi vê hejmarê |
| **-ev qas** | bi vê mêjerê |
| **evandin/diev îne/bievîne** | hez kirin |
| **evd** | 1. bende 2. xulam*"bila li Xwedê xweş here, bila li evdan xweş neçe" |
| **evdal** | derwêş, gerok |
| **evdoşekalo** | hespê pîrê yî girs |

| | |
|---|---|
| **evistin/dieve /bieve** | 1. evîndar bûn 2. jê hez kirin |
| **evîn** | 1. eşq 2. hezkirin3. Sewdaserî |
| **evîndar** | 1. aşiq 2. hezkirî, dilikî 3. Sewdaser |
| **evîndarî** | 1. aşiqtî 2. hezkirîtî, dilikîbûn 3. Sewdaserî |
| **evor** | heywanê nêçîrê |
| **evra** | Pîroz |
| **evrandin/dievrîne/bievrîne**1 | . pîrozmend bûn 2. Şêkirandin |
| **evrandî** | Pîrozmend |
| **evrar** | Pîrozmendî |
| **evrar bûn** | pîroz bûn |
| **evrar kirin** | pîroz kirin |
| **evrayî** | Pîrozî |
| **evsing** | dafika ku bi keviran tê jenîn da ku kevok têkevinê |
| **extebot** | Heştpê |
| **ew** | (r) cînavka şanîdanê ya ji bo kesê li dûrê *"ew riya ku te berê xwe dayê, ez jê hatime" |
| **eware** | bêkêr û yax |
| **eware bûn** | bêkêr û yax bûn |
| **ewidîn/diewide/biewide**1 | . hîn bûn 2. meşq kirin 3. perwerde bûn*"filan kes gur e û ewidiye(elimiye)" |
| **ewiqandin/diewiqîne/biewiqîne** | 1. bilandin2. banandin 3. Xapandin |
| **ewiqîn/diewiqe/biewiqe**1 | . bilîn 2. banîn 3. Xapîn |
| **ewk** | filan û bêvan |
| **ewlad** | zarok *“ewladê ku şora bavê xwe neke, di sîwanekê de werdibe” |
| **ewle** | 1. bêxetere 2. Asa |
| **-(pê) ewle bûn** | pê ve emîn bûn |
| **ewlehî** | 1. ewlekarî, emniyet2. îtîmad 3. Asayîş |

| | |
|---|---|
| **ewlekarî** | 1. emniyet 2. temînatdarî 3. Asayîş |
| **ewlemend** | xwediyê emanet û siyanetê |
| **ewr** | mija ku li esmên berî baranan komî ser hev dibe û jê baran dibare |
| **ewrawî** | esmanê bi mij û moran |
| **ewret** | di îslamê de endamên ku dîtina wan ji aliyê biyaniyan ve heram e |
| **ewtandin/diewtîne/biewtîne**1 | . (kûçik ) bang dan reyandin 2. zimanê yekî dirêj kirin |
| **ewtîn/diewte/bîewte** | 1. (kûçik ) bang dan, reyîn2. (mirov) bi di-jûnkarî pizepiz kirin *"çiqasî keviran bavêjî sê (segî), dê ewqasî biewte" |
| **exik** | Belxem |
| **ex kirin** | belxem ji devî avêtin derve |
| **exlaq** | 1. sinc 2. xwî û xislet3. serinc 4. taybetmendî*"çiya diguhere, lê exlaq naguhere" |
| **exlewik** | Tawe |
| **exte** | hespê xesandî |
| **extirme** | Xenîmet |
| **ey!** | baneşaneke gazîkirinê ye |
| **eyalet** | koma parêzgehan |
| **eyan** | 1. kifş 2. eşkere*"dar bi berê xwe ve eyan e, mêr bi navê xwe" |
| **-(lê) eyan bûn** | 1. jê re xu ya bûn 2. hatin xewnê |
| **eyar** | 1. postê gurandî 2. derdanka çêrmîn a ku tiştan dikinê *"ji hirçekî, du eyar dernayên" |
| **eyarşîr** | postê ku şilahiyê dikinê |
| **eyd** | 1. demên şahiya dînî û civakî 2. şahî *"eyd tê, xêr û ber pê re" |
| **eydanî** | 1. kincên eydê yên xizmetkirî 2. şirînahiya ku di eydan de tê belavkirin |
| **eylo** | balindeyek e |
| **eynî** | mîna heman tiştî; wekî *"kalo çû seferê, hat eynî ew kerê berê" |
| **eywan** | di malan de jûra navendî; hêwan |
| **ez** | (r) cînavka kesê yekemîn a yekjimar *"mêrê ehmeq dibêje: ‘ez’" |
| **ezan** | bangawaziya ji bo nimêjê *"ezan e, riya malê nizane" |
| **ezan dan** | (bi gaziya nimêjê) bang kirin*"dîkê çê, hê di hêkê de ezan dide" |

| | |
|---|---|
| **ezbenî** | Ezxulam |
| **ezezî** | Ezperestî |
| **ezimandin/di ezimîne/ biezimîne** | 1. mêvan kirin2. jê re mazûvanî kirin |
| **eziyet** | 1. azar 2. şkenc3. Seza |
| **ezîz** | 1. berdil 2. berkeftî3. delalik *"bûka xalê, ezîza malê" |
| **ezîze** | 1. delalika malê 2. rahibeya dêrê |
| **ezman** | esman *"erdekî hişk, ezmanekî bilind" |
| **ezmûn** | 1. îmtihan 2. Tecrube |
| **ezmûngeh** | cihê ku tecrube lê tên pêk anîn; taqîgeh |
| **ezperest** | kesê ku tim di heyra xwe de ye; xweperest |
| **ezwaz** | kibrît, niftik |

# Ê

| | |
|---|---|
| **ê/Ê** | tîpa heftemîn a alfabeya kurdî ye; dengdêreke dirêj e, cîderka wê pêşderkî ye, di belavbûna wê de dev nîvgirtî ye û asta belavbûna wê navincî ye |
| **ê [I]** | erê |
| **-ê [II]** | tewanga nêrtiyê ye*"rizqê gur be, xema şivên bêhûde ye” |
| **-ê [III]** | nîşaneya cînavka ku di dawiya lêkerê de tê bikaranîn wekî: ez diçimê , min dayê |
| **-ê [IV]** | ravekerê nenas ê nêrzatiyê *"ez hê he me, ê te me" |
| **ê din** | ne ev/ew |
| **êdî** | ji vir şun de, ji vê qasê wêdetir |
| **êgin** | 1. jêhatî 2. xwedanferaset |
| **êgin bûn** | 1. jêhatî bûn 2. xwedanferaset bûn |
| **êk** | 1. hev 2. yek |
| **ê ku** | 1. kesê ku 2. tiştê ku*"gur e ê ku lê dixe, qijik e a ku dixwe" |
| **êk û du** | hev û du |
| **êl** | eşîr, hoz, qebîle *"êla bê serwerî, wekî bedena bê serî" |
| **êlbat** | cureyekî çivîkan e |
| **êldar** | kesê ku xwediyê qebîleyekê ye, hozdar |
| **êlinc** | hestiyên milî |
| **êlincî** | rewşa tevilheviya asikê ya berî vereşanê |
| **-êlincî hat yekî** | dike ku vereşe, qilqalê wî tev rabû |
| **êm** | alif |
| **-ên** | vetetandeka binavkirî ya ji bo pirjimariyê |
| **êngar** | şevereşa hera tîr |
| **êrçal** | şûm, nehs |
| **êrçalîtî** | şûmî, nehsî |
| **êreqan** | nexweşiya zerikê |
| **êreqe** | cotê ku sewalan davêjinê û wisa cot dikin |
| **êrîş** | 1. bi riya ragihandinê daberizîn yekî an jî aliyekî; destdirêjî 2. ji bo dagirkirin an jî rizgarkirinê bi ser yekî/aliyekî de girtin *"êrîşa gur, pêz ditirsîne" |

| | |
|---|---|
| **-êrîşên hovane** | hucûm an jî berhucûmên wehşî |
| **êrîşkar** | kes ê ku destdirê jiyê dike |
| **êrîş kirin** | destdirêjî kirin |
| **êrîş meşandin** | hucûm li dar xistin |
| **êsta** | a niha, îcar |
| **êstir** | hêstir |
| **êş** | 1. azar û şkênc 2. keder û renc 3. zecr û ezab *"êşa tiliyê, ya hemû laşî ye" |
| **-êşa giran** | ta |
| **-êşa reş** | şêrpence |
| **-êş û ûş** | derd û kul |
| **-êşa zirav** | cureyekî êşên kuxikê ye; jana zirav |
| **êşandin/diêşîne/biêşîne**1 | . azar lê kirin 2. rencîde kirin *"bar min naêşîne, binbar min diêşîne" |
| **êşbir** | dermanê êşkuj |
| **êşiyayî** | 1. azardîtî 2. qehirî3. rencîdebûyî *"diranê êşiyayî, dê rojekê were kişandin" |
| **êşîn/diêşe/biêşe** | 1. jê azar dîtin 2. zecirîn 3. qehirîn *"xwelî li wî seriyî ku heft serî jê neêşin" |
| **êşnasî** | teşxîs, diyarkirina cureyê nexweşiyê |
| **êstper** | kulîlkek e |
| **êtir [I]** | 1. ji bilî vê 2. êdî 3. di dawiyê de |
| **êtir [II]** | 1. sebr 2. aramî3. tebatî |
| **êtir kirin** | 1. sebr kirin2. tebitîn |
| **êtixî** | eyba mezin, belaya bêpere *"êtixiyên kirî, tên pêşiyê" |
| **êtûn** | cihê ku hesin tê de tê bihujandin; kûreya hesingeran, hêtûn |
| **êvar** | danê şevê *"adarê, berf giha guliyê darê, nema danê êvarê" |
| **êvarbaş** | **-** şevbaş |
| **êve** | xem nake |
| **-êve ku hat** | xem nake ku bê |
| **êvelî** | olintî, taytore |

| | |
|---|---|
| **êvişandin/diêvişîne/biêvişîne**1 | . bexişandin2. canazarî kirin *"xelq dewê xwe ê tirş ji meriyan naêvişîne" |
| **êvişandî** | bexişandî*"derba êvişandî, ne ya xwediyan e" |
| **êvitîn/diêvite/biêvite** | (ji ber lêdan, kulbûn û birîndarbûnekê) perçifîn |
| **êvnî** | 1. laşê bihêz û bijûn2. mirovê lêkdayî |
| **êvnîk** | pihêt |
| **êvnûte** | êvnî |
| **êwiran** | avakirina baregehê li cihekî bikêrhatî |
| **êwirandin/diêwirîne/biêwirîne** | 1. sitirandin2. hewandin |
| **êwirîn/diêwire/biêwire**1 | . sitirîn 2. hewîn |
| **êwran** | debara malê; abor |
| **êxre** | dirûna devê telîs û têran |
| **êz** | 1. zîl, bişku 2. ajeroya daran |
| **êzimk** | falinca zarokan |
| **êzing** | 1. darê şewateyê yên hişk 2. kesê serhişk*"êzing, nabe text" |
| **êzingdank** | cihê ku darên şewateyê datîninê |
| **êzingvan** | kesê ku darên şewateyê dibire an jî difiroşe |

# F

| | |
|---|---|
| **f/F** | tîpa heştemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku li gorî cîderka wê diranlêvkî ye, li gorî belavbûna wê fîzek û hişk e |
| **facir** | kesê ku bêminet û bêtirs gunehan dike |
| **fafik** | tat, lal |
| **fafon** | daringekî mînanî hêsin e û jê aman tên çêkirin û kurteya wî ya latînî Al e; bafûn |
| **faîz** | riba |
| **faîzxur** | ribaxur |
| **fal** | remil |
| **falavêj** | remilbêj |
| **falname** | remildank |
| **fanorî** | kirasê şevê |
| **fanos** | panos |
| **fantên** | lîstika bi kaxizên qimarê |
| **farqûsk** | kefkanî/berkanî |
| **farzik** | çavbirçî |
| **fasiq** | 1. gunehkar 2. facir |
| **fasiqtî** | 1. gunehkarî 2. facirtî |
| **faş** | 1. fahiş 2. bêar |
| **faşûn** | darekê meht û giran ê ku piştî cot li ser rûyê zeviyê digerînin |
| **faşûn kirin** | li ser rûyê zeviyê faşûn gerandin |
| **fatereşk** | gurçik fatfatik kevoka kûvî |
| **fatihe** | sûreya yekemîn a Qurana Pîroz |
| **-fatihe xwendin** | 1. dua kirin 2. di nimêjê de sûreya yekemîn a Qurana Pîroz xwendin |
| **fatik** | cureyekî margîseyan e |
| **fatûj** | çakûçê kevirbiran |
| **fatûj kirin** | kevir şeh kirin û birîn |
| **fayde** | sûd û kelk |

| | |
|---|---|
| **faydedar** | sûdwer û behredar |
| **fayke** | kinca hûnandî ya ku dewsa qutik tê lixwekirin |
| **fecr** | berbang |
| -**fecra sadiq** | berbanga rasteqîn a ku piştî wê nimêja sibehê tê kirin |
| **feçer** | kesê ku serê bêvila wî bilind e |
| **feçer kirin** | zor lê kirin |
| **feda** | qurban, gorî |
| **fedakar** | cangorî |
| **feda kirin** | gorî kirin |
| **fediyok** | fedîkar |
| **fedî** | şerm |
| **fedîkar** | şermoke |
| **fedî kirin** | 1. şerm kirin2. mehcûb bûn *"çav ji çavan fedî dikin" |
| **fehetkar** | fedîkar |
| **fehl [I]** | sewalê nêr ê ji bo tovî *"kurî li fehlan, xwarzî li xalan" |
| **-hatin fehlan** | (sewala mê) wextê gonxwarina wê hatin |
| **fehl [II]** | fal |
| **fehm** | têgihiştin |
| **fehm kirin** | tê gihiştin*"heke mirov ji yekî fehm neke, ji sedî jî fehm nake" |
| **felat** | serfirazî |
| **felaqe** | lêdana binê piyan |
| **-felaqe kirin** | li binê piyan xistin |
| **felek** | çerxa cîhanê |
| **-feleka xayîn** | gera çerxa cîhanê ya dijî xwestina yekî |
| **feleqe** | sezaya bi lêdanê |
| **feliqandin/di feliqîne/ bifeliqîne** | tîke kirin, parçe kirin |
| **felişandin/di felişîne/ bifelişîne** | 1. li erdê xistin2. pêxem lê xistin 3. belav kirin |
| **felişîn/difeliş e/bifelişe** | 1. li erdê ketin 2. pêxem lê ketin 3. belav bûn |

| | |
|---|---|
| **felît** | 1. zîrek 2. ciwan |
| **felîte** | jina qûnek |
| **felîtetî** | qûnektî |
| **felq** | tîke, parçe |
| **felqedest** | bi qasî kefa destekî |
| **felsefe** | retkok |
| **-felsefeya heyatê** | retkoka jiyanê |
| **felş bûn** | mechûb bûn |
| **fena** | mîna, eynî wê, weke, notla |
| **fend** | 1. huner 2. konetî3. fesal *"kevirê êş çiqasî giran be jî, aşvan bi fenda xwe wî radike" |
| **fendbaz** | 1. dekbaz 2. xasûk |
| **fener** | çiraya destan |
| **feq** | dafik, tele |
| **-feq danîn** | tele/dafik danîn |
| **feqizandin/di feqizîne/ bifeqizîne** | fizirandin |
| **feqîh** | kesê ku di dîn de pisporiyê digere |
| **feqîr** | 1. xizan 2. bêtawan3. bêkes *"feqîr bi feqîran re bizewicin, dê parsek ji wan çê bibin" |
| **fer [I]** | 1. hejmarên yek, sê, pênc û hwd |
| **fer [II]** | kit |
| **-ferek sol** | kiteke solê |
| **fer [III]** | teyisok, çirûsk, |
| **fera** | aman |
| **feramûş bûn** | 1. xera bûn 2. betal bûn 3. bêhemal bûn |
| **feramûş kirin** | 1. xera kirin 2. îflas kirin 3. îhmal kirin |
| **feraq** | aman *"feraq tune pê here avê, deyn dike dide xêra dê û bavê" |
| **feraqşo** | amanşo |
| **feraset** | 1. çemk 2. fêhm û hizr 3. zihniyet |
| **feraşo** | 1. kesê ku feraqan dişo 2. alava amanşûştinê |

| | |
|---|---|
| **ferd** | 1. kes 2. takekes |
| **ferde** | telîs |
| **ferdî** | takekesî |
| **ferec** | 1. felat 2. nîşaneya berbangê *"desthilanîn, fereca xêrê ye" |
| **ferenc** | kulav |
| **ferfûr** | amanên ji acûrê; kaxetîtik, porselen |
| **ferheng** | 1. çand 2. dab û nêrît 3. berhevoka peyvên zimanekî; peyvname |
| **ferhengok** | peyvnameya biçûk |
| **fericîn/diferi ce/biferice** | temaşe kirin |
| **ferikîn/diferi ke/biferike** | 1. ji hev belav bûn2. tarovaro bûn |
| **ferisandin/di ferisîne/ biferisîne** | tehlîl kirin, dahûrîn |
| **ferişte** | milyaket, melek |
| **ferman** | 1. emr 2. tehlîmat3. rêzek *"fermana hêştirê hat, rovî bazda" |
| **-fermana mîrî** | emrê resmî |
| **fermanber** | 1. karmend2. peywirdar |
| **fermandar** | 1. emîr 2. mîrê ku xwediyê hêzeke leşkerî ye 3. di artêşê de rayedarê ku berpirsê desteyeke leşkerî ye |
| **fermî** | resmî |
| **fermo** | kerem bikin! |
| **ferman** | rakirin emrê qetlyiamê dan |
| **fersend/firse nd** | derfet, îmkan |
| **ferş/ferşik** | raxisteka nava malê *"bila li erşan be, ne li bin ferşan be" |
| **ferûc** | varik |
| **ferwerdar** | 1. hukumdar2. mîr |
| **ferx** | dîkê varikê |
| **ferxe** | jina geveze |
| **ferxes** | 1. tirxes 2. nîvxesandî |
| **ferxik** | têjik |

| | |
|---|---|
| **feryad** | dengê ku hawariyê dixwaze |
| **feryad kirin** | (ji bo hawariyê) qîjîn |
| **ferz** | 1. fermana Xwedê2. karê îcbarî |
| **ferzan** | zana |
| **ferzanî** | zanatî |
| **ferz bûn** | 1. ji aliyê Xwedê de ferman hatin 2. karekî îcbarî diyar bûn |
| **ferzende** | 1. alim 2. zana |
| **ferzîn** | di lîstika setrencê de kevirê ku wezîriyê dinimîne |
| **ferz kirin** | 1. (Xwedê) ferman kirin 2. îcbar kirin |
| **fesad** | kesê ku navbera xelqê xera dike; ewan |
| **fesadî** | karê xerakirina aştiya xelqê; ewanî |
| **fesal** | 1. pîvan 2. qeys 3. rêbaz |
| **feşk** | 1. pêxem 2. feramûşî |
| **feşkilandin/difeşkilîne/bifeşkilîne** | 1. belav kirin2. tarovaro kirin 3. pûç derxistin |
| **feşkilîn/difeşkile/bifeşkile** | 1. belav bûn 2. tarovaro bûn 3. pûç derketin |
| **fetilandin/difetilîne/bifetilîne** | 1. zivirandin 2. vegerandin |
| **fetilîn/difetile/bifetile** | 1. zivirîn 2. vegerîn *"av nafetile, ba di cihekî da nasekine" |
| **fetisandin/difetisîne/ bifetisîne** | 1. xeniqandin2. şeniqandin |
| **fetisîn/difetise/bifetise** | 1. xeniqîn 2. şeniqîn*“malê xesîsan, difetise” |
| **fetrûm** | derziya ku berî nexweşiyan ji bo berevaniyê tê lêxistîn |
| **fetrûm kirin** | dermanê avkî bi şiringeyê berdan binê çêrmî |
| **fetwa** | ramana fiqhî |
| **-fetwa derxistin** | di heqê babetekê de ramaneke şerîetê diyar kirin |

| | |
|---|---|
| **fewitandin/difewitîne/bifewitîne** | 1. ji dest derxistin 2. pê negihiştin tu tiştî |
| **fewitîn/difewite/bifewite** | 1. bertelef bûn 2. ji dest çûyîn |
| **feylezof** | retkokzan |
| **feza** | seqa |
| **fezayî** | seqayî |
| **fê** | cureyekî nexweşiyê ye |
| **fêd** | erdê bixîz ê ku piştî vekişîna avê dertê holê |
| **fêdar** | kesê ku bi nexweşiya fêyê ketiye |
| **fêkî** | mêwe |
| **fêl** | dek û hîle |
| **-fêl û tele** | dek û dolab |
| -**fêlên firewn û şîretên Mûsa tevî hev kirin** | helalî û heramî berdan ser hev |
| **fêlbaz** | dekbaz û hîlebaz |
| **fêm** | 1. feraset 2. zêhn 3. hizr û raman |
| **fêm kirin** | 1. tê gihiştin2. pê hesîn *"dîwaro ji te re dibêjim, bûkê tu fêm bike" |
| **fêmkor** | 1. bêferaset 2. serkevir |
| **fêr** | zanîn |
| **fêr bûn** | hîn bûn |
| **fêre** | îbret |
| **-fêre girtin** | jê îbret wergirtin |
| **fêr kirin** | hîn kirin |
| **fêrgeh** | 1. pol 2. dibistan |
| **fêris** | hêja, egîd |
| **fêrist** | pêrist |
| **fêtokî** | 1. fediyok 2. şermoke*"fêtokî li mêran, kenokî li jinan nayê" |
| **fêz** | aliyê jorîn *"agir berda kome, xwe da fêza zomê" |
| **fihêl** | paqijî |

| | |
|---|---|
| **fihêl kirin** | paqij kirin |
| **fikar** | 1. derd û keder 2. tirs û xof 3. tatêl û mitale |
| **fikirîn/difikire/bifikire**1 | . ramîn 2. hizir kirin |
| **filan** | kes an jî tiştê nediyar |
| **-filan û bêvan** | 1. ew kes û yê dîtir 2. ev tişt û yê dîtir *"filan kes mangeya biga ye (qûnek e)" |
| **filç** | pozpelişî |
| **file/fileh** | 1. peyrewê cenabê Îsa eleyhiselam 2. kesê ku di angaşta peyre wiya cenebê Îsa eleyhiselam de ye *"filehekî bi rûyekî, ji bawermendokê bi du rûyan çêtir e" |
| **filitandin/difilitîne/bifilitîne**1 | . rizgar kirin2. serfiraz kirin 3. jê pekandin |
| **filitîn/difilite/bifilite** | 1. rizgar bûn 2. serfiraz bûn 3. jê pekîn *"bûka malê xweş xebitî, ker girêda û cehş filitî" |
| **filq** | xêvik |
| **filûs** | zayendî |
| **filûz** | maden |
| **fincik** | 1. qefz 2. lotik, hindirik 3. bizav |
| **fincik avêtin** | lotik avêtin |
| **find** | mûm, şem |
| **findank** | mûmdank, şemdank |
| **finfinok** | derewa bêbinî |
| **finik** | hêstira viringî |
| **fiqih** | 1. fehm 2. şerîet |
| **fir [I]** | qurteke vexwarinê |
| **-fir kirin** | vexwarin |
| **fir [II]** | kêşeke baçikê-fir lê xistin (baçik) kêşan |
| **fir [III]** | hilbaskîn *"fira mirîşkê, hetanî ber kadînê ye" |
| **fira** | tiştê ku zû difire |
| **firandin/difirîne/bifirîne**1 | . tê werkirin 2. bi bilindî avêtin 3. pekandin, pengizandin |
| **firaq** | aman |

| | |
|---|---|
| **firaqşo** | amanşo |
| **firavîn** | navroj *"firavîn bi fayde ye, lê dawî bi lome ye" |
| **firawan** | 1. fireh 2. dorfireh |
| **firçe** | porçe |
| **firdik** | xwarina ku ji nanê diçînine nav dêw tê çêkirin |
| **firdikandin/difirdikîne/bifirdikîne** | 1. nan çandin nav dêw 2. hûr kirin, çînîn |
| **firefir** | dengê domdar ê ku ji awayê vexwarinê yî dengî tê |
| **firefir kirin** | bi awayekî dengî vexwarin |
| **fireh** | 1. biber, ne kêmber2. boş, pir, zehf *"mirî melûn nebe, di gorê de cî fireh e" |
| **fireh bûn** | 1. belaş bûn2. peraş bûn 3. zêde bûn 4. kêmber nebûn*"heke dil fireh be, rê jê re gelek in" |
| **firehî** | 1. nekêmberî 2. boşî 3. pirî 4. zêdehî |
| **fireh kirin** | (ji aliyê berahiyê ve) lê zêde kirin |
| **firênek** | nemûş, gulor |
| **-firênek li sêrî gerandin** | nemûş lê alandin, gulor li sêrî kirin |
| **firêqet** | serfiraz û bêminet |
| **firêqet bûn** | serfiraz û bêminet bûn |
| **firêqetî** | serfirazî û bêminetî |
| **firêqet kirin** | serfiraz û bêminet kirin |
| **firêz** | çêreya ku ji nava zevî û bîstanan tê kaxkirin |
| **firfat** | 1. gincirgincirî, zîvalzîvalî3. kevn û kol, kevnekotik |
| **firfaz** | lotik, hindirik |
| **firfire** | perwane |
| **firfirok** | firildax |
| **firgeh** | di balafirgehê de erdê ku balafir lê datîne |
| **firj** | fişkîniya sewalan |
| **firijîn/difirije/bifirije** | (sewal) fişkîn |
| **firildax** | teqemeniya ku difire û li hewa diteqe |
| **firinde** | sewala bibask; perinde |

| | |
|---|---|
| **-firindeyê efsûnî** | teyrê çîrokan |
| **firisandin/difirisîne/bifirisîne**1 | . xitimandin2. tepisandin |
| **firîk [I]** | simbila ber stewînê*"agir bi rihê yekî ketibû, yekî jî digot: 'ez dê firîkên xwe li ber biqelînim" |
| **-firîkî firîn** | 1. wekî firîka stewî pekîn 2. çûn hatenehatê |
| **firîk [II]** | giyanewerê jînşê |
| **firîn/difire/bifire** | 1. perwazî esmên bûn 2. hilfirîn 3. pekîn, pengizîn*"her teyr, bi baskên xwe difire" |
| **firîngeh** | firgeh |
| **firîsk** | cureyekî kulîlkên biharê ye |
| **firîw** | xap |
| **firîwandin/difiriwîne/bifiriwîne** | xapandin |
| **firk [I]** | binavber |
| **-firk kirin** | 1. bi navber danîn 2. livlivî kirin |
| **firk [II]** | livlivî, kitkitî |
| **firk [III]** | zayîna mehînê |
| **firk [IV]** | 1. qolinc 2. tivanc |
| **-firk ketin** | qeydika dêst bayê tivancê ketin bazinê dêst |
| **-firk lê ketin** | qolincî bûn |
| **firk [V]** | qirç |
| **-firk şikandin** | qirç şikandin |
| **firkandin/difirkîne/bifirkîne**1 | . mist dan 2. pişirandin |
| **firkefirk** | dengê pîneyê ku li ba dibe |
| **-firkefirka alayê** | hejîna perçemê ya li ber bayî |
| **firloq** | heştirme |
| **firmêsk** | rondik, hêstir |

| | |
|---|---|
| **firmêskrêj** | teqemeniyên rondikrêj |
| **firingî** | bacana sor; pamîdor |
| **firne** | alava ku tê de nan û xwarin tên pijandin |
| **firnik** | 1. firneya biçûk2. kulfikên bêvilê |
| **firo** | şîrê mihan ê payîzê |
| **firofehş** | 1. beletewş 2. çîleçepî 3. xelexwar |
| **firoke** | navgîneke raguhastinê ya hewayî ye |
| **firoşgeh** | dukana danûstanê |
| **firoşkar** | kesê ku danûstanê dike |
| **firotin/difroşe/bifiroşe**1 | . bi bêrdelekî dayîn 2. xayintî kirin *"êqil derxin firotinê, her kes dê aqilê xwe bikire" |
| **firqask** | 1. lotik 2. qefz |
| **firqas kirin** | 1. lotik avêtin 2. qefz dan |
| **firsend** | derfet *"heke firsend têkeve destê kêmfirsendan, dê însanan jî nal bikin" |
| **-firsend payîn** | li keysa xwe nihêrîn |
| **firş** | sebr |
| **firşik** | ziravê sewalan ê ku jê havênê penîrî jî tê çêkirin |
| **firşteng** | bêsebr |
| **firyar** | kesê ku balafiran diajo |
| **fis** | 1. baberçûna bêdeng û bêhnkirêt 2. têkiliya zayendî ya di navbeyna firindeyan de *"bi fisan çarşev boyax nabe" |
| **fisegur [I]** | cureyekî kariyên çolê/beriyê ye |
| **fisegur [II]** | zîvalzîvalî, kirtimkirtimî |
| **fisek** | baberketî |
| **fisgenî** | 1. bêhnkirêt 2. bêrûmet |
| **fisgenîtî kirin** | karên xwe yên kirêt veşartin |
| **fisikîn/difisike/bifisike**1 | . (dara ku tê tewandin) şikestin 2. (pê) şiqitîn |
| **fisirîn/difisire/bifisire** | fizirîn |
| **fis kirin** | 1. ba ber ketin2. (firinde) gayîn |
| **fismirî** | xesîs, xasûk |

| | |
|---|---|
| **fisqe** | pîvazên biçûk |
| **fistiqîn/difist iqe/bifistiqe** 1 | . bi xeletî gerîn 2. tehisîn, pê şiqitîn |
| **fistoqî** | 1. axozî 2. çolêketî3. li malê newanbûyî4. segê navmalagerî |
| **fisû** | ajaleke bêhnkirêt e |
| **fişar** | 1. zext, pêkutî 2. zordestî 3. gotina beletewş |
| **fişarde** | pertaf |
| **fişkefişk** | 1. bêhnefişkên li ser hev 2. girî û xilîtkişandina tevlihev |
| **fiş kirin** | (bêfil) paqij kirin fitar di meha remezanê de dema xwarinê |
| **-fitara xwe vekirin** | 1. şîva rojiyê xwarin 2. rojî betal kirin |
| **fite** | 1. fetwa 2. firsend |
| **-fite dîtin** | firsend bi dest xistin |
| **-fite jê standin** | firsend jê standin |
| **fitîl** | 1. pilte 2. dermanê ku ji qûnê ve tê hildan |
| **fitîlî** | di hûnanê de devhuçik û sernavika ku bi awayekî rakişandî tê daxistin |
| **-fitîliya faykeyekî daxistin** | tara devhuçik û sernavika fakeyî bi awayekî rakişandî hûnan |
| **fitir** | sedeqeya meha remezanê |
| **-fitirê yekî xweş kirin** | kesek baş kutan |
| **fitnekar** | 1. navtêdayî, niçandî 3. ewan, fesad |
| **fizar** | dengê kesê ku hawariyekê dixwaze |
| **fizirîn/difizir e/bifizire**1 | . jê revîn 2. baz dan 3. peywir hiştin |
| **fîkandin/difi kîne/bifikîne** 1 | . li fîqê xistin 2. fîtefît kirin 3. vît kirin |
| **fîl** | li ser rûyê erdê sewala hera mezin a şîrdar a ku difinê wê xortimkî ye |
| **fîncan** | piyaleya qehweyê; pingan |
| **fîndê** | jina ku bi xemla xwe ve fortên xwe davêje |

| | |
|---|---|
| **fînik** | tûle, cewr |
| **fînok** | jin an jî mêrê pûç |
| **fîntoz** | fîndê |
| **fîq** | 1. bilûr 2. şimşal 3. pîpik |
| **-li fîqê xistin** | li tûtikê xistin |
| **fîqefîq** | dengê fîq û pîpikê |
| **fîqefîq kirin** | tûtetût kirin |
| **fîqerojk** | karî, kuvark |
| **fîre** | virik |
| **-fîre dan** | virikî bûn |
| **fîrefîr** | 1. kirmekirma hespan 2. fîqefîq |
| **fîrefîr kirin** | 1. (hesp) bi kirmekirm xwarin 2. fîqefîq kirin |
| **fîskanî** | 1. biçûçik 2. hûrde |
| **fîş [I]** | avika ku dibe sedema nifşên nû |
| **-fîşa pêxemberan** | nesla paqij û bêguman a qasidên Xwedê |
| **fîş [II]** | şilahiya ku bi pest ji hundir derdikeve derve |
| **fîşek** | fîşeng |
| **fîşeng** | berika çekê |
| **-fîşeng dan ber dêv** | berik avêtin ber lûleya çekê û amadeyî teqandinê kirin |
| **fîşengbend** | rextê fîşengan |
| **fît** | 1. guhê bel 2. çik |
| **fît bûn [I]** | 1. (guh) bel bûn 2. çik rabûn ser xwe |
| **fît bûn [II]** | 1. bi qasî hev bûn 2. kuta bûn |
| **fît kirin [I]** | 1. (guh) bel kirin 2. çik rakirin li ser piyan |
| **fît kirin [II]** | 1. deynê xwe dan 2. (di qimarê de) ji hevrikê xwe birin û tiştek di tûrê wî de nehiştin |
| **fîtê** | jina bêrûmet a qunek |
| **fîtik** | 1. fîqik, tûtik 2. lêdana bi du tiliyan; çipîsk |
| **fîtik lê xistin** | 1. li fîqê xistin 2. (bi du tiliyan) çipîsk lê xistin |
| **-fîtik lêketin û şikîn** | pir tenik û nazik bûn |

| | |
|---|---|
| **fîz** | 1. fors 2. quretî |
| **-fîz avêtin** | xwe kiz kirin |
| **fîza** | qure |
| **fîzatî** | quretî |
| **fîzar** | kûzenûz |
| **-fîzar kirin** | kûzenûz kirin |
| **forq** | qûnek |
| **forqtî** | qûnektî |
| **fors** | quretî û pozbilindî |
| **-forsa şêran** | quretî û kêfa serokan |
| **fors kirin** | 1. bêminet tev gerîn 2. kêf kirin |
| **fort** | 1. fors, quretî 2. pozbilindî |
| **-fortê xwe avêtin** | 1. fors kirin, xwe qure kirin 2. pozbilindî kirin |
| **fote** | çarşev |
| **fuhûş** | 1. qûnektî 2. zina |
| **fûrandin/difûrîne/bifûrîne**1 | . (zêde kelandin heta ku) bi ser re dan avêtin 2. (zêde pêkutî bi ser de birin heta ku) enirandin û bihêrs kirin |
| **fûrîn/difûre/bifûre** | 1. (zêde kelîn heta ku) bi ser re avêtin 2. (zêde pêkutî bi ser de birin heta ku) enirîn û bihêrs bûn |

# G

| | |
|---|---|
| **g/G** | tîpa nehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê ezmandevî û qirikî ye, awayê belavbûna wê girtî û nerm e |
| **ga** | 1. dewarê nêr 2. mirovê gakî *"ga li mêrgan kok dibe, mela li malên miriyan" |
| **gabinêzk** | êşeke stûyan a ku nahêle serî bileqe |
| **-gabinêzk girtin** | tûşî êşa gabinêzkê hatin |
| **gaçêrîn** | çivîkek e |
| **ga dan** | 1. ga berdan ser, ji bo ku çêlek avis bimîne berga kirin 2. qûnektî kirin an jî bi yeke din dan kirin |
| **gadar** | çêregeha dewêr |
| **gadare** | kêra kalanî |
| **gadêr** | kesê ku gayên cotî diçêrîne |
| **gadoş** | amana acûrî |
| **gagolekî çûn** | li ser çar lepan meşîn |
| **gaj** | giloka tayî |
| **gakêl** | 1. cotyar, cotkar 2. gayê cotî |
| **gakovî** | nêrê askê; gayê çolê |
| **gal** | deng, awaz |
| **galegal** | 1. sohbet 2. hevpeyvîn |
| **galegal kirin** | 1. sohbet kirin 2. ji yekî re behs kirin 3. bi hev re peyivîn |
| **galgalîsk** | gewrî |
| **galim** | 1. meşa ber bi yekî ve 2. devjenî |
| **galiske** | erebeya ku hesp dikêşin |
| **galte** | henek, tirane |
| **galtefis** | selexane, teral |
| **galtevan** | henekbaz |
| **galûk** | çoyê ku ji bendê çêrmîn î şidiyayî dihûnin û pê sewalan diajon |
| **galûk kirin** | bi galûkê ajotin |
| **galûm** | gurzê cengên berê; tombiz |

| | |
|---|---|
| **gam** | kam |
| **gamêş** | dewareke kedîkirî ye "mêş û gamêş, xwedî tînin li pêş" |
| **gamil** | sermil |
| **gamisk** | gayê kovî yê ku di qirguliya wî de misk heye |
| **gamirok** | cureyekî nexweşiyan e û zarokên nûbûyî pê dikevin |
| **gan [I]** | 1. giyan/can 2. jîn |
| **gan [II]** | guhan, çiçik |
| **gan [III]** | gayîn |
| **gandêr** | qûnek |
| **gandêrî** | qûnektî |
| **gandîl** | berên girs ên ajalên dotinê; guhandîl |
| **ganek** | 1. sewala mê a ku heweskara nêrê xwe ye2. jina mêrxwaz (xirxwaz) |
| **gangil** | cureyekî çêreya ku nepijî tê xwarin |
| **gangilok** | porgustik |
| **ganî** | 1. giyanewer, candar, ruhber 2. jîndar |
| **garan** | 1. keriyê dewêr 2. mexela naxira dewêr*"ne gayê min li garanê ye, ne jî galegala nanê gavên dikim" |
| **garing** | feraqa ku di dema kamkirinê de didine bin gayên gêleyê da ku rêx û mîza wan di ser zêd de nerije |
| **garis** | cureyekî zêd e û wekî gênim tê bikaranîn*"çûçik, li ser garisên feqîran datîne" |
| **garîte** | darekî dirêj û stûr ê ku didine ser avahîyan û darên zirav jî didine ser wî; kêran |
| **garnigan** | çêreyeke şîrdar e û dibe sedama îshalê û hundirçûnê; ûzelik |
| **garta** | navgîneke barkêşiyê ye û dişimite garye çenberî, erebe |
| **gasin** | qada nava gundekî |
| **gasingeh** | qada fireh |
| **gav [I]** | navbera du lingên vekirî |
| **-gav avêtin** | 1. navbera du lingan vekirin û meşîn2. dest pê kirin |
| **-bi ser re gav kirin** | bi ser re baz dan aliyê din |
| **gav [II]** | 1. dem 2. heyam*"gava ku xêr dibare, gûyê sêwiyan tê" |
| **-gava din** | 1. xulekek berê2. kêliyeke berî niha |
| **gavan** | kesê ku dewêr diçêrîne*"gavan ber bi mal e, jina gavên şixulkar e" |

| | |
|---|---|
| **gavber** | 1. hevrik 2. reqîb |
| **gawir** | 1. kafir 2. bêînsaf |
| **gawirî** | 1. kafirtî 2. bêînsafî |
| **gawuk** | bihukek e |
| **gaxend** | sersala filehan |
| **gayîn/digaye (digê)/bigaye (bigê)** | 1. (sewal) pê re têkiliya zayendî danîn 2. (mirov) nayîn, tecawuz kirin *"ne gaye, ne jî zaye" |
| **gayz** | gaz |
| **gaz [I]** | lûtke |
| **gaz [II]** | dibûr |
| **gaz [III]** | alava mixkêşanê |
| **gaz [IV]** | endazeya ku maweya wê ji sersîngê heta serê tiliyan e (68 cm) *"her kes bi gaza xwe cawê dipîve" |
| **-gaz û caw di destê yekî de bûn** | biryar û ferman di dêst de bûn |
| **gaz [V]** | daringekî curecureyî yê ku di nav bayî de heye |
| **gazbir** | meqesdar, cawbir |
| **gazel** | belgedar ên zer ên ku payîzê diweşin |
| **gazgaz** | vijevij, vizeviz, guregur |
| **gazinc/gazin d** | 1. dilman2. lome 3. gilî û şikayet*"dera ku te hêvî jê heye, te gazind jî jê heye" |
| **-gazincên xwe kirin** | 1. giliyên xwe kirin 2. aciziya xwe nîşan dan*"gazincên xwe ji jina xwe re bike, giliyên xwe li cem diya xwe veke" |
| **gazindok** | şikayetkar |
| **gazî** | 1. bang 2. dengî*"gaziya dû siwaran, nagihêje xwediyê xwe" |
| **gazî kirin** | 1. vexwendin2. bang lê kirin *"gazîkirin adet e, nehatin dewlet e" |
| **gazîname** | bangname |
| **gazîvan** | 1. bangdayî 2. vexwendî |
| **gazîz** | kurmê hêjîrê |
| **gazûz** | bizûz |
| **gebirge** | dahola mezin |
| **gebol** | xwarineke ku ji ard û savarî tê çêkirin *"devê wan, li gebola wan" |

| | |
|---|---|
| **geda** | 1. parsek 2. xizan |
| **gedandin/digedîne/bigedîne** | destê xwe li ber xelqê vekirin; pars kirin |
| **gede** | kurik, lawik |
| **gef** | tehdîd |
| **-gef û gur** | tehdîd û diransîqandin |
| **-gefa kuştinê** | tehdîda bi qetlkirinê |
| **-gef lê xwarin** | tehdîd kirin |
| **-gefa me ji hev dibihure** | em hev dinasin û ev tişt di navbera me de nabin pirsgirêk |
| **gefandin/digefîne/bigefîne** | gef lê xwarin |
| **gefok** | 1. tehdîdkar 2. gurêx |
| **geh [I]** | ji aliyê piştê ve goşt û masûlkeyên ku ji çongê hetanî gêzikan e; teşk |
| **geh ... geh [II]** | carinan û ne di her demê de *"dem bi dor e, geh li jêr e, geh li jor e" |
| **gejmirandin/digejmirîne/bigejmirîne** | hêran |
| **gel** | birek mirovên ku xwediyên ziman, we lat, rewişt û tîtaleke hevpar in; netewe |
| **-gelê kurd** | neteweya kurd |
| **gela** | belg |
| **gelac** | 1. belapêşkar 2. fitnebaz |
| **gelacî** | 1. devjenî 2. fitnebazî |
| **gelale [I]** | goştê zêde ê ku di gewriyê hêşîn dibe; aloq |
| **gelale [II]** | 1. moçik 2. numûne3. karê sêwirandî, reşnivîs 4. mijar |
| **Gelarêzan** | Birca Dûpişkî |
| **gelawêj** | 1. meha 8’emîn a salnameya zayînî 2. gerestêrka Zuhelê |
| **gele** | 1. kome 2. zumre |
| **gelek** | 1. pir 2. zêde 3. zehf *"gelekan, mede bi hindikan" |
| **gelemper** | civak, komel |

| | |
|---|---|
| **gelemperî** | giştî, komelî |
| **-kar û barên gelemperî** | xizmetên giştî |
| **gelemşe** | 1. pirsgirêk 2. îxtilaf 3. mesele 4. arîşe |
| **gelendar** | 1. stûna mezin2. kêran |
| **gelêrî** | 1. stran, huner, cil û bergên ku di kelepora gelekî de hene 2. têkildarî civakê 3. malê her kesî |
| **gelêş** | cureyekî xweliyê ye |
| **gelhe** | hejmara kesan; nufûs |
| **gelhanasî** | beşa pisporiyê a hejmarnasiya seriyan |
| **-gelheya çandinî** | hejmara rêjeya kar û barên ziraetê |
| **-gelheya destbidaran** | hejmara çekdaran |
| **gelifandin/di gelifîne/ bigelifîne** | 1. hûr kirin û wekî ardî hêran 2. pişirandin |
| **gelî [I]** | 1. deşt 2. bihurgeh3. navbera du çiyan |
| **gelî! [II]** | (r) baneşana ji bo komekê |
| **-gelî bawermendan!** | ey ew kesên ku bawerî anîne! |
| **gelnas** | dilsoj û xebatkarê ji bo berjewendiyên gel û welatê xwe |
| **gelo** | aya, pirsa ecêbmanê |
| **gelş** | 1. arîşe, kêşe 2. îxtilaf3. cudatiya ramanan*"afirê gameşan, bû warê gelşa mêşan" |
| **gelû** | navenda çemberê |
| **gelwaz** | bendê ku dendikên |
| **gêzan** | , hêjîr û hwd li ser têne raxistin; gewlaz |
| **gem** | hevsarê bi dizgîn û devgem *"ker bi gem û hefsaran, mêr bi soz û biryaran" |
| **-gem li dêv xistin** | ji axaftinê re destûr nedan |
| **gemar** | qirêj |
| **gemarî** | bi qilêr |

| | |
|---|---|
| **gemarî bûn** | 1. qirêj bûn2. herimîn |
| **gemarî kirin** | 1. qirêj kirin2. herimandin *"kaniya ku te av jê vexwar, gemarî meke" |
| **gemaro** | dorpêç, rapêçan |
| **gembol** | segê nêr |
| **gemirandin/ digemirîne/ bigemirîne** | 1. rû û rûçikên tiştekî guherandin2. dirûv guherandin3. daqurtandin |
| **gemirîn/digemire/bigemire**1 | . li gemariyekê gerîn 2. pişivîn |
| **gemî** | keştî |
| **gemor** | tiştê ku dirûve tehlbûnê lê dikeve; tehlovançkî |
| **gemş [I]** | kulm, gulmist, kefedest |
| **gemş [II]** | werzişa zoranîkirinê |
| **gemşandin/digemşîne/bigemşîne** | zoranî dan kirin, bi navê dan lîstin |
| **gemşîn/digemşe/bigemşe** | zoranî kirin/bi navê lîstin |
| **gemşo** | werzişkarê zoranîkirinê |
| **gen** | cureyekî heşeratên ku ji qijniyan mezintir in |
| **genav** | ava mend û genî; avegenî |
| **gencîne** | xezîne, defîne |
| **gend [I]** | aj, zîl, ajero |
| **gend [II]** | bêhna kirêt*"xwarin gend û gû, şûştin reng û rû" |
| **gend [III]** | pûç |
| **gend [IV]** | sûd û kelk |
| **-gend kirin** | sûd û kelk wergirtin |
| **gendel [I]** | mirovê bêkêr |
| **gendel [II]** | kesê ku pere û dahatiya dezgeh an jî kargeha welêt ji bo xwe didize |
| **gendelî** | di karesatên giştî de diziya malê cemawerî genefis 1. ferasetkor 2. bêkêr 3. dek û dolab |
| **genek [I]** | gûnî *"henek, dibin genek" |

| | |
|---|---|
| **genek [II]** | gen |
| **gengaz** | pêkan, mumkin |
| **gengeşî** | 1. nîqaş, gelacî2. devjenî |
| **genijîn/digen ije/bigenije** | efûngî bûn |
| **genim** | zadê ku jê nan û xwarinên sereke tên pehtin *"genim digere û digere, paşê tê di qulika êş de tê xwarê" |
| **genimî** | esmer, qemer |
| **genî** | 1. xerabûyî 2. efûngî, afnikî |
| **genî bûn** | 1. xera bûn 2. efûngî bûn *"av, di golan de genî dibe" |
| **genî kirin** | 1. xera kirin2. afnikî kirin *"ne xwar ne jî da hevalan, genî kir avêt newalan" |
| **genûs** | çikûs, timakar |
| **gep** | 1. dêma rû, alûşk 2. parî, qot |
| **geprûg** | gewrî |
| **ger [I]** | 1. geşt, seyran 2. dor |
| **-gera rastmalê** | dolivgeriya sermayeyê |
| **-gera yekî dan** | bera wî dan; qewirandin |
| **ger [II]** | erdê rast |
| **ger [III]** | heke |
| **geran** | mîrkutê hesinî |
| **gerandin/dig erîne/bigerîn e** | 1. bi rê ve birin2. zivirandin 3. îdare kirin4. birin seyranê*"gerandin derman e, rizq li ser piyan e" |
| **gerav** | gerînek |
| **gerd** | 1. xwelî 2. toz û xubar |
| **gerden** | der û dora gewrî û stûqulkê heta sersîngê |
| **gerdengaz** | bejndirêj |
| **gerdenî** | xemla stûyan a ku heta sersîngan dadikeve; şirdan |
| **gerdelûle** | babelîsk |
| **gerdenxwar** | stûxwar |
| **gerdiş [I]** | 1. ger û seyran2. çerx, zivir, fetl |

| | |
|---|---|
| **gerdiş [II]** | amûr |
| **gerdûm** | erebeya gayan |
| **gerdûn** | 1. alem 2. cîhan |
| **gerdûnî** | 1. alemî 2. cîhanî |
| **gerelavij** | strangotina bi dorvegerî |
| **geremol** | 1. sûresat 2. hêwirze 3. tevilhevî |
| **gerestêrk** | stêrka ku di hevsenga tavê de gera xwe didomîne; rojgeran |
| **gerew** | rehîn, barimte*"gerew, li garanê ye" |
| **-di gerewa yekî de çûn** | ji dêla yekî ve xwe dan kuştin |
| **gerew dan** | ji ber yekî ve kefaletek dan |
| **gerew kirin** | rehîn girtin, barimte kirin |
| **gerger** | erdê bikevir |
| **gergere** | gêre |
| **gerguhêz** | (r) lêkerê ku bireserê werdigire; têper |
| **gerhan** | gerîn *"gerhan derman e û rizq li ser piyan e" |
| **gerik** | 1. tovê gul û giyayî yê hûrik ê mînanî tozê2. toza ku havînan li ser belgên daran dinîşe 3. gera avê ya biçûk |
| **gerisandan/digerisîne/bigerisîne** | 1. pêpest kirin 2. destverû kirin3. pelçiqandin 4. çewsandin |
| **geriyayî** | gerok *"kalê zemanan, dipirse ji xortê geriyayî" |
| **gerîde** | gerok, geştiyar |
| **gerîh** | behîva negihiştî; behîvterk |
| **gerîn/digere/bigere** | 1. seyahet kirin, geşt kirin, çûn seyranê 2. (kar) bi rê ve çûn *"aş digere bi avê, law dike karê bavê" |
| **gerînek** | kuna di bin avê a ku av bi zivirînê tê re derbasî cihekî din dibe |
| **gerînende** | 1. mudîr 2. berpirsyar |
| **gerînge** | 1. rojgeran 2. pergala ku gera tiştan têkûz dike |
| **germ** | 1. nesar 2. tîndêr3. keliyayî 4. sincirî*"her kes xwe li agirê germ digire" |
| **-germ û sermaya felekê dîtin** | pêrgî bûyerên tehl û şirîn hatin û tê de pispor bûn |
| **germahî** | tînahî |

| | |
|---|---|
| **germav** | 1. kaniya ku ava kel jê diherike 2. serşok |
| **germavî** | kesê ku çûye germavê |
| **germ bûn** | 1. tîndar bûn, sincirîn 2. kelîn *"hesinê sar, bi hilmê germ nabe" |
| **germesûk** | qumaşê erzan; gincir |
| **germiçang** | gerînge |
| **germijandin/ digermijîne/ bigermijîne** | germixandin |
| **germijank** | alava gêrebayî ya ku tiştê avî dikelîne |
| **germijîn/dig ermije/ bigermije** | germixîn |
| **germijok** | germixî |
| **germik** | pîneyekî gerimkirî yê ku datînin ser laşê kesê westiyayî da ku giyanê wî nerm bibe |
| **germixandin /digermixîne / bigermixîne** | di germê de sekinandin û çêja wê xera kirin |
| **germixîn/dig ermixe/biger mixe** | di germê de man û çêj lê xera bûn |
| **germiyan** | warê ku zivistanan lê tê êwirîn û sitirîn |
| **germî** | xwarineke ku ji savarî tê çêkirin |
| **germjimêr** | alava ku tîna heyî dipîve; tînjimer |
| **germ kirin** | 1. sincirandin2. kelandin |
| **gername** | rojnivîska heyamên gera geştiyarekî; geştname |
| **gernas** | 1. egîd, qehreman2. wêrek |
| **gerok** | pîşekarê geşt û seyranê |
| **gers** | cureyekî çêreyê ye |
| **gerûşe** | karesat/bobelat |
| **gerewêrk** | gerestêrk |
| **geş** | 1. boş 2. jîndar 3. herikbar |
| **geş bûn** | 1. jîndar bûn 2. herikbar bûn |
| **geşbîn** | kesê ku xwediyê ramaneke erênî ye |

| | |
|---|---|
| **geş kirin** | 1. agir gur kirin2. dilxweş kirin |
| **geşedan** | pêşveçûn, pêşketin |
| -**geşedanên aborî** | pêşveçûnên di warê îqtisadê de |
| **geşe pê dan** | pêş ve birin |
| **geşt [I]** | ger, seyran |
| **-çûna geştê** | derketin seyrangehekê |
| **geşt [II]** | pars, rewcîgerî |
| **-derketina geştê** | gerîna li pars û pûrsê |
| **geştiyar** | gerok, seyah, seyranî |
| **geştname** | gername, seyran- name |
| **gevaztin/digevêze/bigevêze** | gevizandin |
| **gevel** | porê tevlihevbûyî |
| **gevel bûn** | gijik bûn |
| **gevez** | rengê gulê; sor |
| **geveze** | 1. alava ku pergala xebata wê teqoze bûye 2. devê ku hînî axaftina çepel bûye |
| **geveze bûn** | 1. (alav) pergala xebatê teqoze bûn2. (dev) hînî axaftina çepel bûn |
| **geveze kirin** | 1. pergala xebata alavekê teqoze kirin 2. ji devçepeliya kesekî re destûr dan |
| **gevizandin/digevizîne/ bigevizîne** | li erdê birin û anîn; vegevizandin |
| **gevizîn/digevize/bigevize** | xwe li erdê birin û anîn; vegevizîn |
| **gevizk** | cihê bi toz û xîz ê ku ker û hesp xwe lê digevizînin; tozgevizk |
| **gevzol** | gevel |
| **gewc** | gêj |
| **gewende** | 1. tulî 2. mitrib |
| **gewher** | 1. cewher, kevirên giranbiha 2. puxte |
| **gewixandin/ digewixîne/bigewixîne** | 1. ser jê kirin 2. fetisandin |

| | |
|---|---|
| **gewixîn/digewixe/bigewixe** | 1. ser jê bûn 2. fetisîn |
| **gewr** | rengê spî yî tarî |
| **gewre [I]** | 1. mezin 2. gir, girs 3. birêz |
| **gewre [II]** | di hûnanê de çaviyeke rast û yeke çep |
| **-gewre çêkirin** | çeperast hûnan |
| **gewrecûnkî** | gewrotankî |
| **gewrik** | nexweşiyeke çêrmî ye |
| **gewrî** | qirik, xeneq *"gewriya ku biqul e, bê rizq namîne" |
| **-gewrî lê miçiqandin** | 1. tirs lê firandin 2. ajal lê dan firotan û bê spîtayî hiştin |
| **gerotankî** | rengê gewr ê çilmisî |
| **gewşîn** | taybetî |
| **gewzîn** | di heyberan de bedewiya gewherî û dîtbarî |
| **-gewzîna hunerî** | di karekî hunerî de pîvana bedewiya gewherî û dîtbarî |
| **gez [I]** | cureyekî daran e |
| **gez [II]** | gest, şidandina diran a bi ser tiştekî de |
| **gezandin/digezîne/bigezîne** | (xwarina tehl û tûj) ziman û gewrî sotin |
| **gezek** | çêreya gezende ya pîjpijî |
| **gezende** | tiştê ku aliyê xwe ê tûj bi tiştekî din vedide |
| **gezgezok** | çêreya kefgezkê |
| **gez kirin** | 1. diran lê şidandin2. xwarin |
| **gezme** | tîra kevanê |
| **gezo** | cureyekî şirîniya ku dinişe ser belgên daran; selwa |
| **gezoke** | 1. zimandirêj 2. devçepel *"bi ber re diçî gezoke ne, di pişt re diçî pîzoke ne" |
| **geztin/digeze/bigeze** | gez kirin |
| **gêç [I]** | di hin alavên pîvandinê de derziya ku rêjeyê nîşan dide |
| **gêç [II]** | heriya kilsê |

| | |
|---|---|
| **-gêç kirin** | bi heriya kilsê seyandin |
| **gêj** | 1. hişaloz 2. bêhişê ku wekî sermestan tevdigere*"filan kes mirîşka gêj e (bêkêr e)" |
| **gêj bûn** | 1. hişaloz bûn2. hiş ji serî çûn |
| **gêjde** | hişaloz |
| **gêjelok** | lîstikeke zarokan a ku di dora xwe de dizivirin hetanî gêj dibin |
| **gêjelokî** | zarokê ku gêjelok lîstiye û lewre gêj bûye |
| **gêjgerînek** | 1. gerînek2. tiştê ku pir têvel û têkilhev e |
| **gêjgerînk** | 1. ziviroka bayî; bablîsok 2. tiştê ku pir têvel û têkilhev e |
| **gêj kirin** | 1. hişaloz kirin2. hiş ji serî firandin |
| **gêjo** | gêjde |
| **gêjnok** | anix |
| **gêl [I]** | gil |
| **gêl [II]** | ehmeq, bodele |
| **gêl [III]** | sewdaserê bêkêr |
| **gêlaz** | mêwyeke e |
| **gêle** | 1. cihêkirina dan û kayê bi gerandina sewalên ku bi hev ve girêdayî ne li ser zadê çinandî; kam 2. pestîl |
| **gêlegêl** | bûyer, qewimîn |
| **-tûşî gêlegêlên giran ha tin** | ji karesatan bi awayekî serkeftî bihurîn |
| **gêle kirin** | 1. bi kamê genim ji qeselî jibartin 2. çê ji neçêyî veqetandin3. pêpest kirin 4. li dora hev zivirandin |
| **gêlme** | têkelkirina gelek cureyên xwarinan |
| **-gêlmeya gavanî** | 1. xwarina ku gavan ji xwediyên naxirê belav dike 2. tiştên curecureyî |
| **gêran** | balix, kamil |
| **gêran bûn** | kamil bûn |
| **gêranî** | balixtî, kamilî |
| **gêrav** | çêkirina tiştekî li gorî nimûneyeke heyî |
| **gêrav kirin** | tiştek li gorî mînakeke berdest çêkirin |
| **gêr bûn** | 1. gindirîn, total bûn 2. wergerîn |

| | |
|---|---|
| **gêre** | gêle *"gêre, bi golikan nabe" |
| **gêreba** | bayê vegerok ê ku ji herka avê çêdibe; cêreyan |
| **gêrik** | mûstang, morî*"dijminê te gêrik be jî, hesabê wî bike" |
| **gêr bûn** | 1. feşk lê ketin, pêxem lê ketin 2. çewt wergerîn |
| **gêr kirin** | 1. wergerandin2. gindirandin, total kirin |
| **gêro bûn** | 1. egle bûn 2. bilîn |
| **gêro kirin** | 1. egle kirin 2. bilandin *"biharan xwe şil mekin, payîzan xwe gêro mekin" |
| **gêrûse** | destar |
| **gêsû** | guliyê porî |
| **gêşref** | komik |
| **gêwil** | hizir û viyana mirovî ji bo kirin an jî nekirina karekî |
| **gêwildar** | kesê ku dilê wî bi kirina karekî heye; bigêwil |
| **gêwilsar** | dilsar |
| **gêwilsar bûn** | ji karekî dilsar bûn |
| **gêwilsarî** | dilsarî |
| **gêwilsar kirin** | ji karekî dilsar kirin |
| **gêwil şikandin** | dilsar kirin |
| **gêwilşikên** | kesê/tiştê ku mirovî dilsar dike |
| **gêwlê** | jina ku karî li gorî dilê dike |
| **gêwlo** | mirovê ku her gav û du gav ne li ser temtêlekê ye |
| **gêz** | 1. cureyekî daran e2. fêkiyên vê darê |
| **gêzek** | her du hestiyên ku di kêlekên kapên însanan de ne û yên ajalan jî di paşiyê de ne |
| **gêzer** | gizêr |
| **gêzgêrik** | gêzî |
| **gêzirandin/di gêzirîne/bigê zirîne** | 1. bilandin2. xapandin |
| **gêzî** | alava maliştinê; siqayîl |
| **gêzîvan** | 1. siqayîlfiroş2. paqijker |
| **gibîse** | meha ku 29 rojan dikêşe; kebîse |
| **gid** | kîteyeke ji bo gazikirina karikan û bizinan(gidê: mê/gidî: nêr) |

| | |
|---|---|
| **gidaran** | berazê nêr |
| **gidik** | (di zimanê zarokan de) karik |
| **gidî** | tew lo lo! |
| **gidîş** | parta giyayê/zadê dirûtî |
| **gift** | soz û gotin |
| **-giftî yekî tev gerîn** | li gorî sozê ku yekî daye hereket kirin |
| **gihan(gihîn)/ digihe/bigihe** | 1. lê asê bûn 2. devîdevî lê kirin 3. stewîn, kemilîn |
| **gihandin/digi hîne/bigihîne** | 1. lê asê kirin 2. stewandin, kemilandin*"hespê çê, zengûyan nagihîne xwe" |
| **gihanek** | (r) girêka peyv û hevokan |
| **gihar** | tenîsk |
| **gihar bûn** | tenîsk bûn |
| **gihayî** | stewî, berkemal |
| **gihiştin/digih êje/bigihêje[ I]** | 1. kemilîn 2. bi dest xistin 3. stewîn |
| **gihiştin/digih êje/bigihêje[ II]** | 1. lê asê bûn2. devîdevî lê kirin 3. hatin asteke diyar 4. kemilîn*"ez hêdî diçim bela digihêje min, zû diçim ez digihêjim belayê" |
| **gij** | şidet, tundî |
| **-di gijekê de çûn û hatin** | di nefesekê de çûn û hatin |
| **gijevij** | dengê ku ji çûn û hatina tiştan tê |
| **gij bûn** | ji êrîşê re amade bûn |
| **gijgijîn/digijg ije/bigijgije** | 1. xwe kiz kirin 2. xwe ji êrîşê re amade kirin3. xwe veperimandin |
| **gijik** | 1. porê vîzvîzî 2. porê gevel |
| **-gijika hev kişandin** | pev çûn û porên hev verûtin |
| **gijîn/digije/b igije** | 1. gijgijîn 2. (sewalê nêr) baz dan ser (a mê) 3. pelişîn hev û li hev xistin |
| **gij kirin** | xwe ji êrîşê re amede kirin |
| **gijlok** | zîpikên hûr gijnîj cureyekî çêreya pîjpîjî ye |

| | |
|---|---|
| **-gijnîj girtin** | qirş û qal pê ve aliqîn |
| **gijo** | 1. kesê ji erîşê re amade 2. baneşana ku pê sewalan didin gadan |
| **gijogijo kirin** | 1. bangî gadanê kirin 2. pêşkêş kirin 3. berdan hev |
| **gil** | herî |
| **-gil û gemar** | herî û qirêjî |
| **gilahe** | xenîmet, extirme |
| **gilar** | goştê ku di bin erzenê de dadiliqe |
| **gilare** | bistikê darê; qurm |
| **gilav** | ava gemar |
| **gilç** | singê sertûj ê ku di ji ber hin sedeman erdê de tê çikandin; xilç |
| **gilde** | gilok, gaj |
| **gildegild kirin** | bildebild kirin |
| **gildêma** | cureyekî çêreya ku dendikên wê hişkirî tên xwarin û jê rûn tê bidestxistin |
| **gildî** | pîne û potikên wekî balûleyê li hev pêçayî |
| **gildî kirin** | werpêçan |
| **gildîn** | gemara li der û dorê; zibil, gilêş |
| **gildgildo** | bildbildo |
| **gildo** | 1. kesê ku ji axaftina wî nayê gihiştin; bildo, tato 2. zimanfisek |
| **gilê** | 1. girêdana bend û têlan a bi hev ve; girêk2. werma ji ber lêketina tiştekî sext |
| **gilê bûn** | 1. bi hev ve bûn2. tê de kêrtikek çêbûn, werimîn |
| **gilê kirin** | bi hev ve bestin |
| **-xwe gilê kirin** | xwe givaştin hev |
| **gilêne** | spîtka çêv |
| **gilêş** | 1. bermayiyên qirêj û kêrnehatî 2. zibil |
| **gilêşdank** | derdanka zibilê |
| **gilêz** | ava zeliqok a ku li dêv dirije; şorik |
| **-gilêz bi dêv ketin** | 1. dev jev bûn û jê ava zeliqok rijîn 2. pir azwer bûn |
| **gilgil [I]** | heriya hasilkirî ya ku acûrpêj pê kaxetîtan çêdikin |
| **gilgil [II]** | 1. garis 2. danê spî *"mirîşk di xewna xwe de gilgilî dibîne" |

| | |
|---|---|
| **gilik** | di endamê zayendî yê mêzayan de riya avikê ya ku digihêje malzarokê û li bin lûleya mîzkêş e; nîçik, çilik, *"qûnekê gotiye: 'aqile min dibire, lê aqilê gilika min nabire' " |
| **gilî** | 1. gotin 2. şikayet, gazind *"gilî hate zaran, dê têkeve nav malan" |
| **gilîdar** | gazindok |
| **gilî kirin** | 1. gazindê xwe jê kirin 2. jê şikayet kirin |
| **gilm** | guliyên darê |
| **gilmik** | guliyên darê yên biçûk |
| **gilok** | tayê ziyî/hilçinandî; gaj, gilde |
| **gilol** | girover |
| **gilolî** | giroverî |
| **gilor [I]** | berê dara qajê |
| **gilor [II]** | 1. nemûş 2. fêlbazî |
| **-gilor kirin** | 1. nemûş kirin2. fêlbazî kirin |
| **gilor [III]** | girover |
| **-gilor kirin** | gindirandin |
| **giloxe** | cûcika ku teze ji hêkê derketiye |
| **giloxe bûn** | (cûcik) ji hêkê derketin û girs bûn |
| **gilp** | gulp |
| **gilûmût** | girover |
| **gilûmûtkî** | giroverkî |
| **gilviçandin/digilviçîne/bigilviçîne** | 1. pirçiqandin2. pan kirin |
| **gilviçîn/digilviçe/bigilviçe[I]** | dil jê mayîn |
| **gilviçîn/digilviçe/bigilviçe[II]** | 1. di bin lingan de virçiqîn 2. pelixîn |
| **gilyaz** | gêlaz |
| **gincir** | pîne û potikên peritî; zîval |
| **gincirgincirî** | (pîne) qelşqelşî û zîvalzîvalî |

| | |
|---|---|
| **gincirgincirî bûn** | (pîne) qelşqelşî û zîvalzîvalî bûn |
| **gincirgincirî kirin** | (pîne) qelşqelşî û zîvalzîvalî kirin |
| **gindirandin/ digindirîne/ bigindirîne** | 1. total kirin 2. wergerandin |
| **gindirîn/digi ndire/bigindi re** | 1. total bûn2. wergerîn |
| **gindor** | 1. cureyekî sewzeyan e; qire 2. girover3. bankutik |
| **ginegin** | dengê kesê ku ji bêfilê diaxive |
| **ginegin kirin** | ji bêfilê axaftin |
| **ginginok** | kesê ku ji bêfilê diaxive |
| **gir [I]** | 1. kêrt 2. bilindahî |
| **gir [II]** | 1. bermaya ber bêjingê 2. arek |
| **gir [III]** | 1. girs 2. mezin3. geltegan |
| **gir [IV]** | 1. rik, hêrs 2. bela3. awat û azwerî 4. întiqam |
| **-gir [V]** | paşgireke navdêrsaz û rengdêrsaz e |
| **gir [VI]** | 1. xwirê gurîbûnê2. rikhatin *"divê mirov girê xwe bi destên xwe dixwirîne" |
| **giramî** | 1. îhtiram, qedrdanî, rûdanî 2. rêzdarî |
| **giramî girtin** | 1. rêz girtin2. îhtiram kirin |
| **giran** | 1. nesivik 2. hêdî3. zexm 4. bibiha 5. cidî *"aqilê giran, mûyî kêr dike" |
| **giranbiha** | 1. qedrmezin2. biqîmet *"ji azadiyê bêhtir tiştekî giranbiha nîn e" |
| **giran bûn** | 1. ji rewşa sivikiyê derketin 2. hêdî hêdî xebitîn |
| **giranî** | 1. nesiviktî 2. hêdîkahî3. zexmî 4. bibihatî5. cidîtî *"giranî pîvana zêran e, sivikî bobelata ber deran e" |
| **giran kirin** | 1. ji rewşa sivikiyê derxistin 2. kar ewiqandin |
| **girar** | xwarineke ku ji birinc û savarî tê çêkirin*"girar bi xwê, xwê bi tahm" |
| **girav** | parçeyek bejahiya ku doraliya wê bi avê ve hatiye rapêçandin |
| **giravî** | giramî |
| **girbêj** | bêjinga ku kunên wê fireh in; serad |
| **girde** | girav |
| **girdek** | tîpên mezin ên wekî A,B,C... |

| | |
|---|---|
| **girdik** | masûlke girdirûn taye, çerxe |
| **giregir** | 1. payedar 2. rayedar3. çîna bijarte |
| **girêba** | 1. nexweşiyeke bakî û jandar a ku dikeve masûlke û gehên mirovî2. kînora ku di rehçikên xwînê de derdikevin |
| **girêbend** | 1. cihê girê ya ku bendik lê hatiye şidandin2. peyman |
| **-girêbenda zewacê** | peymana nikahê |
| **girêbest** | şala navê; şûtik |
| **girêcan** | bêaramiya giyanî |
| **girêçik** | movik |
| **girêdan** | 1. bi hev ve kirin, bestin 2. gilê kirin*"hesp li ser afirê keran nayê girêdan" |
| **girêdayî** | 1. biservekirî2. gilêkirî, beste |
| **girêhişk** | hişkegilê |
| **girêk** | cihê ku bi hev ve hatiye bestin; gilê *"girêka ku bi destan vebe, hewceyî diranan nake" |
| **-girêk ketin qirikê** | 1. kelogirî bûn 2. nan di gewriyê de nedehîn |
| **girêpêç** | babelîsk |
| **girêz** | gilêz |
| **girfan** | berîk, cêb |
| **girfik** | 1. felqedestek hevirê ku jê nanek tê çêkirin2. her du nermegoştên hêtan |
| **girgirik** | 1. ereboka zarokan2. ereboka destan a ku giraniyên hetanî 100 kîloyî lê bar dikin 3. alaveke maliştinê ya bi qasî destekî ye û pê gildîna hûrik tê paqijkirin |
| **girgîn** | 1. gurêx 2. hêrshatî3. bêhnteng |
| **girhan** | xwe bi xwe xitimîna qul û qelîştekan |
| **girij** | kesê mirûztirş û giran bûn rûpirçî |
| **girijîn/digirije/bigirije** | 1. (seg) bezîn hev2. (mirov) gef lê xwarin |
| **girik** | 1. şêlî, nezelal 2. kêrtê ku pir ne bilind e |
| **girisîn/digirise/bigirise** | mezin bûn |
| **giriyandin/digirîne/bigirîne** | 1. bi girî ve kirin2. behicandin *"dostê ku te bigirîne baş e, ne yê ku te bikenîne" |

| | |
|---|---|
| **girî** | 1. rijandina hêstiran2. nûzenûz *"bi girî, ji gorê ranabin mirî" |
| **-girî pere nekirin** | xemgîniyê têra vegerandina tiştê çûyî nekirin |
| **girîdeng** | 1. lorîn 2. dengê giriyê 3. zêmar |
| **girîn/digirî/bigirî** | 1. hêstir rijandin 2. bi ser de keser kişandin û lewre rondik barandin*"çûn dewsa miriyan, her kes li miriyê xwe giriya" |
| **girîng** | tiştê ku hebûna wî pêwist û watedar e |
| **girîngî** | pêwistî û watedarî |
| **girîngî dan** | 1. bi her du destan girtin 2. pêwist hesibandin 3. qedr dan |
| **girkan** | çiyayê ku lûtkeya wî heriyeke agirîn direşîne derve |
| **-girkanê hilçûyî** | çiyayê ku lûtkeya wî ya agirîn zindî ye û her gav xeternak e |
| **-girkanê mirî** | çiyayê ku lûtkeya wî ya agirîn teqiyaye û êdî ne xeternak e |
| **girj** | tivancî |
| **girj bûn** | tivancî bûn |
| **-girjbûna masûlkeyan** | tivancîbûna pazûyan |
| **girmijîn/digirmije/bigirmije** | (ewr û esman) deng vedan *"ewrê reş digirmije" |
| **girmik** | 1. kulm, lep 2. zêdehiya serê dûvê pêz a ku bi qasî kulmekî ye |
| **girnawkî bûn** | 1. dema gonxwarina pisîkê hatin2. çav li qûndetiyê kirin |
| **girnijandin/digirnijîne/bigirnijîne** | 1. kenandin2. duqat kirin |
| **girnijîn/digirnije/bigirnije** | 1. kenîn 2. duqat bûn |
| **girnoz** | girtikgirtikî, kêrtik- kêrkitî |
| **girole** | navgîna barkêşiyê |
| **giroşk** | dervank, tepedor |
| **girov** | 1. berate, nîşane, elamet 2. belgeya ku rastiya rewşekê an jî tawana bersûcekî derdixe holê |
| **girove** | belge |
| **-giroveya ajovaniyê** | belgeya erebe-ajotinê |

| | |
|---|---|
| **-giroveya bazirganiyê** | destûrnameya ticaretê |
| **girover** | gilomûtkî, çenberkî, xeleqkî |
| **girs** | 1. gir 2. mezin |
| **girse** | civateke pirjimar; kom |
| **girseyî** | têkildarî civateke pirjimar; komasî |
| **girsik** | hirmiya çolê |
| **girş** | stûn |
| **girte** | zabitname |
| **girtek** | 1. parçeyek kaxeza ku firoşkar wekî giroveyekê dide kiriyarî, tê de biha, nav û cureyê bûjenan tê nivîsandin2. giroveya ku dezgeh an jî saziya têkildar di dema wergirtina diyariyan de dide xêrxwazan; meqbûz |
| **girtenivîs** | kesê ku zabitnameyê digire |
| **girtin/digire/ bigire** | 1. hildan 2. wergirtin 3. bi dest xistin 4. zeft kirin*"her kes, xwe li ronahiyê digire" |
| **-girtina berê rojê** | rewşa ku heyv an cismekî asûmanî yê din têkeve navbera dinya û rojê, roj ji dinyayê xuya nebe û dinya tarî bibe |
| **-girtina berê heyvê** | rewşa ku dinya têkeve navbera heyv û rojê, heyv rojê nebîne û di tariyê de bimîne |
| **-girtin ser xwe** | pejirandin |
| **girtî** | 1. mehkûm 2. bengî3. dîl 4. venekirî *“destê dayî, ser ê girtî re ye” |
| **girtîgeh** | 1. hepisxane 2. bendîxane |
| **girtole** | kesê bi dest û pê |
| **girûz** | girnoz |
| **girûz kirin** | 1. meht kirin2. darotin 3. şimşat kirin |
| **gişk/gişt** | 1. hemû, her kes/her tişt 2. bi temamî*“dîn pir in, gişt ne li cem hev in“ |
| **giştgiyan** | beden, laş |
| **giştî** | gelemper, tevahî |
| **-serokê giştî** | rêvebirê gelemper |
| **giştîname** | namedor, belavok |
| **gitî** | cîhan |
| **givande** | 1. cihê bilind; kendal 2. hêl |

| | |
|---|---|
| **givandin/digivîne/bigivîne** | havên kirin, meyandin |
| **givar** | kesê ku xwîna mirovî lê dikele |
| ***givêrandin/digivêrîne/ bigivêrîne*** | dehandin |
| **givêrîn/digivêre/bigivêre** | dehîn, (tiştê xwarî) helîn |
| **givir** | pisîka kovî |
| **givî** | şîrê havênkirî |
| **givîşk [I]** | tivanc |
| **-givîşkî bûn** | tivanc û qolinc di lêş de peyde bûn |
| **givîşk [II]** | bizava ku mirov ji egera xewê an jî westanê xwe radikêşe |
| **-givîşk dan** | palûşkên xewê pê ketin |
| **givrik** | mirovê hêzdar û xurt |
| **givrik bûn** | gihiştin û mezin bûn |
| **giya** | 1. çêre, hêşinahî 2. çêreya çinandî ya ku wekî alif tê bikaranîn*"nokê, giya rabû li ser kokê" |
| **giyan** | 1. can 2. ruh, gan |
| **-Giyanê Pîroz** | cenabê Cibraîl eleyhiselam |
| **-giyanê xwe dan** | 1. bi ser heqiya xwe de çûn; mirin2. cangorî bûn |
| **giyanewer** | 1. zindî, jîndar2. candar |
| **giyanewernas** | pisporê ruhberan |
| **giyanewernasî** | zanistên têkildarî jiyana giyandaran |
| **giyanî** | zindîtî, ruhanî |
| **giyaxur** | 1. sewalên ku diçêrin2. kesên ku -weke rêman- goştî naxwin |
| **giz** | 1. hizir 2. viyan |
| **gizdar** | balkêş |
| **gizêr** | cureyekî hêşînahiyê ye û hem bi terî hem jî pijandî tê xwarin |
| **gizgizîk** | giloka biçûk |

| | |
|---|---|
| **gizgizîn/digiz gize/bigizgize** 1 | . tevizîn 2. ricifîn, lerizîn |
| **gizilgo** | giloka ku ta û bendê wê li hev aliyaye |
| **gizing** | elind |
| **gizîr** | xizmetkar, berdestî |
| **gizre** | ardê ku gir hatiye hêran |
| **gizvanok** | gustik |
| **gizû** | rûne xerabûyî |
| **gîhev** | îkramiye |
| **gîheva** | **-** cejnê bexşîşa eydê |
| **gîr [I]** | 1. tund 2. asê 3. girtî 4. rawestayî |
| **gîr [II]** | qebiz |
| **gîrav** | ava ku bi bûjeneke din ve têkel bûye(wek: av û xwê) |
| **gîr bûn** | 1. qebiz bûn 2. rawestan 3. asê bûn |
| **gîre** | qebizbûyî |
| **gîrhe** | peqpeqokên ku ser ava kelyayî dikevin; kef |
| **gîro** | vemayî, paşdemayî |
| **gîro bûn** | 1. taloq bûn 2. egle bûn |
| **gîro kirin** | 1. taloq kirin2. egle kirin |
| **gîsik** | karikê dusalî *"gîsika gurî diçe serê kaniyê û ji eslê avê vedixwe" |
| **gîsin** | di cot de nikilê tûj ê ku erdê vediqelêşe *"cotê bê gîsin, nikil zû lê dişkê" |
| **gît** | 1. rojên zivistanê yên pir sar 2. karesat |
| **gîtik** | hestiyê çîpê |
| **gîx** | xêza ku di şeklê bazinekî de hatiye kêşan |
| **gîzan** | hesinê tûj ê ku pê tiraş dibin |
| **gîzre** | dar a ku ne hişk e ne jî ter e |
| **go** | gog |
| **gobaz** | gogbaz |
| **goc** | 1. kesê di dest û piyên xwe de seqet e 2. kesê ku dest û piyên xwe bi awayekî kêrhatî bi kar nayine û kêmlebat e |
| **gocî** | 1. seqetiya dest û piyan2. kêmlebatiya dest û piyan |

| | |
|---|---|
| **goçavik** | berçavk |
| **goçel** | gopal |
| **goçke** | tîş û qertîş |
| **gog** | hola lîstinê *"gog çiqas gilover be jî, dê li cihekî rast bisekine" |
| **-gog hatin ber çoyî** | ketin ber firsendê |
| **gogbaz** | kesê ku bi holê dilîze |
| **gogelîsk** | lîstîna hola pê |
| **gogerîn** | kêzikeke ku ji gil û gemarê gogên biçûk çêdike |
| **gojîmestî kirin** | (têjika nûzayî) hînî mêtinê kirin, seredan kirin |
| **gol** | 1. lîç 2. her ava ku nakişe *"av di golê de bimîne, dê genî bibe" |
| **gole** | sewalê ku li pêşkeriyî diçe |
| **golik** | têjika çêlekê *"golik tuneye ku bimije, xwesû tuneye ku bikuje" |
| **-golika bipirç kirin zikê yekî** | kuleke bêderman kirin dil û hinavê wî |
| **golikvan** | kesê ku golikan diçêrîne *"dema ku heye, mêvan î; wexta tune, golikvan î" |
| **golim** | kulêmek |
| **gom** | êwirgeha sergirtî ya ku bi şevê pez tê de mexel tê *"goma mirovî, ji qesra xelqê çêtir e" |
| **gon** | berhildan û pelxwarin*"bizin dizîka gon dixwe, lê eşkere dizê" |
| **gonce** | qurmê dar û giyayê hişkbûyî |
| **goncal** | kortal, çal |
| **gongil [I]** | cureyekî goniyan e *"gongil çiqas hol be, dê li cihekî rast bisekine" |
| **gongil [II]** | 1. qat bi qat 2. gustikên porî |
| **gonî** | gûnî *"goni, tu carî di bin berfê de namîne" |
| **gopal** | 1. ço 2. şiva ku destika wê heye 3. şiva serkevan *"darê bi strî, nabe gopal" |
| **gopîtik** | lûtke, zîrwe |
| **gor** | 1. qebr, mezel, meqbere2. kortal *"kes, nakeve gora kesî" |
| **goran mêrg û çîman gorangeh** | mêrga ku bi kêrî bêhnvedan û seyranan tê |

| | |
|---|---|
| **seyrangeh goranî** | 1. kilam, stran2. zaravayeke kurdî ye |
| **gore** | lixwekirina piyan |
| **gorevan** | 1. kesê ku goreyan çêdike 2. kesê ku qebrên miriyan dikole |
| **goristan** | cihê ku qebr lê tên kolan û mîrî lê tên çalkirin *"mirov diçe serdana goristanê, da ku gora wî jî tê de hebe" |
| **gorî** | 1. qurban 2. fedakar |
| **-ez gorî** | ez qurban, ez xulam |
| **gorîçe** | kêlika gorê |
| **gorn** | 1. mala ku havînê tê bikaranîn; sermiyan 2. hevşiyê sewalan |
| **gornebaş** | pîşekarê diziya goristanan |
| **gosan** | cureyekî mêşan e û dişibihe mêşhingivan |
| **gosartme** | 1. rezîl 2. elewat3. rêşkenî |
| **goşe** | 1. guçê ku qiraça wî45 derince ye 2. çim 3. fetl, zivir |
| **goşebend** | qiraca ku endazeya wê 45 derece ye |
| **goşepîv** | alava ku pê qeysa guçan tê pîvan |
| **goşkar** | solbend |
| **goşt** | tebeqeya ku li ser hestiyan hêşîn dibe*"ber goştê çûyî nakeve, ber ser û piyan dikeve" |
| **-goştê nerme** | goştê bêhestî |
| **-goştê hêrayî** | goştê hûr hûrkirî |
| **-goştê heram** | 1. qelewbûna bêteşe 2. goştê ser mûziya mêran a beriya sinetkirinê |
| **goştfiroş** | pîşekarê firotina |
| **goştî** | ; qesab goştî goştê hişkirî |
| **goştpere** | cenîn |
| **goştxur** | sewalên ku debara jiyana wan tenê goşt e û nikarin biçêrin |
| **gotar** | 1. meqaleya wêjeyî2. nutuq |
| **gotebêj** | 1. hevpeyvîn 2. nîqaş |
| **gotegot** | 1. qîl û qal 2. deng û behs 3. qirtevirt*"bi gotegot, mirov naçe cot" |
| **gotin [I]** | 1. soz 2. biryar3. peyman *"mêr ew e ku bibe xwediyê gotina xwe" |
| **gotin/dibêje /bibêje [II]** | 1. axaftin, peyivîn, xeber dan 2. salix dan 3. şehitandin*"gotin: 'bavê te siwaran kuşt an peyaran'; got: 'wekî kuştin, ha siwaran, ha peyaran' " |
| **gotindar** | 1. axivger 2. xeberdayî 3. salixdayî |

| | |
|---|---|
| **gov** | 1. gol 2. gom |
| **govan** | kesê ku bûyer bi çavê xwe dîtiye; şahid, guwah, gove |
| **-govanê dîtî û bînayî** | şahidê ku bi çavê serê xwe buyerek şopandiye |
| **govanî** | şahidtî, guwahî |
| **govan-name** | girove û nivîsarên li ser bûyeran |
| **gove** | govan |
| **govetî** | govanî |
| **govend** | dîlan, zemawend*"govend, bê deng nabe" |
| **-govend gerandin** | dîlan girtin |
| **govendger** | sergovendî, kesê ku dîlanê digerîne |
| **goyende** | 1. kesê ku vedibêje2. salixdayî *"goyende têr xwar, dê dest bi salixan bike" |
| **goyger** | pîşekarê goglîstinê; gogbaz |
| **goyinger** | nobedar, pandî |
| **goyîn [I]** | rêza nobetê, dora payînê |
| **goyîn [II]** | balindeyeke ji malbata pepûkan e |
| **guçl** | 1. komeke fêkiyên bi çiqilekî ve 2. gûşî *"bav rezek da lawî, lawî guçlek tirî neda bavê" |
| **guh** | endamê bihîstinê*"hêştir çiqasî ji hev dûr herin jî, guhê wan tim li ser hev e" |
| **-guh birin** | 1. hetikandin2. veçirçirandin |
| **-guh dan** | 1. jê bihîstin 2. bala xwe dayîn |
| **-li ber guh ketin** | 1. pê hesîn 2. haj pê hebûn |
| **-guh lê dêrandin** | 1. (guh) bel kirin 2. payîn |
| **guhar** | xemla ku jin bi guhên xwe ve dadiliqînin*"Xwedê, guharan dide yên biguh" |
| **guhan** | endamê şîrî yê sewalan |
| **-guhanê xwe kirin** | nêzîkî zayînê şîr ketin guhanan |
| **guhbel** | 1. guhrep 2. sîxur, casûs |
| **-guh bel kirin** | ji xerabiyê re bihîstin |
| **guhçik** | nermegoştê guhî yê ku guharê davêjinê |

| | |
|---|---|
| **guhdar** | kesê ku dibihîze |
| **guhdarî** | têgihiştina salixan*"guhdariya derewan xweş e, lê bawerkirina wan ne xweş e" |
| **-lê guhdarî kirin** | 1. jê bihîstin 2. gotin jê seh kirin 3. bal xwe danê*"berê guhdarî bike, paşê xeber de" |
| **guhdêr** | 1. hişyar 2. balgotindar dar 3. bisemt |
| **guhdirêj** | ker, çarsim axa*"ji bo ziyandayîna xwediyê xwe, guhdirêj, mirinê jî dide ber çavên xwe" |
| **guhertin/diguherîne/ biguherîne** | 1. guhêztin2. şûna yekî yeke din danîn |
| **guher** | 1. warê ku pez lê mexel tê 2. meydana komkirina sewalan *"bizina belek, şivanê kulek, êvarê bi hev re tên guhera teng" |
| **-li guherê man** | 1. li qadê bêxwedî man 2. bi kêrî tiştekî nehatin |
| **guherbar** | tiştê ku dirûvê xwe diguhêzîne nifşeke din |
| **guherîn [I]** | 1. guhêzîn2. qelibîn |
| **guherîn(guhertin)/diguhere/ biguhere [II]** | 1. teşeyeke nû girtin 2. dirûvekî din girtin |
| **guherînkar** | sedemkarê qelibînê |
| **guherto** | awayekî cihê ê heman dirûvî, dirûvekî ciyawaz ê heman tiştî |
| **guhêrgeh** | dezgeh an jî firoşgeha guherîna diravan; seraf |
| **guhêzbar** | tiştê ku neql û sewqiyata wê zû û hêsan tê kirin |
| **guhêztin/diguhêze/biguhêze** | 1. guhertin 2. wergerandin 3. neql kirin4. ferehte kirin *"gayê reş, çêrmê xwe naguhêze" |
| **guhgiran** | kesê ku baş nabihîze |
| **guhmertal** | guhmezin |
| **guhnedar** | 1. serhişkê bêxem 2. bêxemê sersar |
| **guhnelî** | di giyandaran de daxwaza têkiliya zayendî |
| **guhrep** | guhbel |
| **gul** | 1. cureyekî kulîlkan e2. navê kulîlkekê ye*"biçûkê salê, gula malê" |
| **gulan** | meha pêncemîn a salnameya zayînî ye*"gulan e, dew li cem hemûyan e" |

| | |
|---|---|
| **gulav** | ava gulê ya ku ji bo bêhndana wê tê bikaranîn |
| **gulçîsk** | gurçik |
| **guldank** | derdanka ku gulan tê de datînin |
| **guldeste** | berhevoka kar û xebatên wêjeyî |
| **gule** | fîşeng |
| **gulebaran kirin** | 1. fîşeng lê reşandin 2. agir ser piştê pê xistin |
| **gulebûk** | cureyekî kulîlkan e |
| **gulegenim** | simbil |
| **gulendam** | bejnzirav |
| **gulik** | 1. şirik 2. porik3. kulîlk |
| **gulimîn/digulime/bigulime** | 1. elametên jîndariyê nîşan dayîn 2. hilimîn |
| **gulî** | 1. çiqilê darê 2. porê hûnandî *"gulî dirêj e, hiş qirêj e" |
| **gulîfk** | bisk |
| **gulîvandik** | telaşê tayî |
| **gulîzerînî** | jina ku porê wê yî çûr gûlîkî hatiye vegirtin *"gurî dimire, dibe gulîzerînî" |
| **gulkelem** | cureyekî sewzeyan e û pijandî tê xwarin |
| **gulp** | 1. bilq 2. ji nişkê ve3. qurteke vexwarinê |
| **gulpik** | 1. gupik 2. hemû seriyên ku dişibihin serê derzîreqê |
| **gulşen** | gulzar |
| **gulte** | 1. stûn 2. bêra kelekvanan3. darê ku serê wî wekî tîpa T'yê ye, topal didine bin milên xwe û pê bi rê ve diçin |
| **-gulte kirin** | (da ku xwe ber giraniyê ragire) stûn danîn bin garîteyî |
| **gulzar** | baxçeyê gulan |
| **guman [I]** | 1. ewlehî 2. hêvî *"gumana xwe, ji Xwedê mebire" |
| **guman [II]** | şik, şubhe |
| **gum** | qurteke vexwarinê |
| **gumanbar bûn** | di bin şikê de bûn |
| **guman kirin** | tê de ketin şikê |
| **gumgumok** | cureyekî sewalên bejî ye û dişibihe margîseyê |

| | |
|---|---|
| **gumrik** | 1. bihura peretî2. saziya ku hawirde û hinardeyên welêt dişopîne û mîhengê didê |
| **gumş** | 1. parî 2. hop |
| **gun** | hêlik *"heke gunên meta min hebûna, min dê jê re bigota: apo" |
| **gunc** | lûleya avê a binerdî |
| **guncan** | 1. munasib 2. pêkan3. lêhatî |
| **gund** | cih û warê ku ji çend malan pêk tê (ji taxê mezintir û bajarokî biçûktir e) *"melayê nexwendî, digere li nav gundî" |
| **gundî** | şênî û dêmanên ku di wargehên kêmjimar de dijîn *"gundî li hev nexin, romî têr naxwin" |
| **gundwar** | derebajar, cihê ku ne bajar e |
| **gundwarî** | derebajarî |
| **guneh** | sûc, tawan |
| **-guneh daweşandin** | 1. tewbe bazar kirin 2. gunehê xwe kirin |
| **-guneh pê hatin** | 1. dil pê şewitîn 2. dil ber derneketin, heyf pê hatin |
| **gunehkar** | tawanbar |
| **gunekî** | kesê ku bi hêlikreşê ketiye |
| **guneng** | belengaz |
| **gungilî** | 1. gustikgustikî2. badayî 3. gurbiz |
| **gupik** | 1. panî 2. lûtke |
| **gur [I]** | cureyekî heywanên dirinde ye û dişibihe kûçikan *"çêlikên guran, ji mirovî re nabin bira" |
| **-gurê manco** | gurê efsûnî yê çîrokan |
| **gur [II]** | 1. zindî, jîndar2. herikbar |
| **-gur bûn** | 1. holepît jê rabûn 2. zêde bûn |
| **-gur kirin** | 1. alafa êgir pirtir kirin 2. zêde kirin |
| **gurandin/digure/bigure** | 1. post kirin, çerm jê vexistin 2. qutqutî kirin, pir lê xistin |
| **gurc** | şidiyayî |
| **gurc bûn** | şidîn |
| **gurc kirin** | şidandin |
| **gurçik** | du endamên ku di pişta mirovan de ne*"mirov dilî nede, gurçikê naxwe” |

| | |
|---|---|
| **guregur** | 1. dengê bayê xurt 2. dengê erebeyan*"bayê gurgurî, weke jina virvirî" |
| **gurêx** | 1. dir, gurxenêq 2. segê ji gurên kedîkirî |
| **gurg** | navenda tevnê ya ku raçandinê digerîne |
| **gurî [I]** | keçel, serût *"gurî dimirin, porsor dibin" |
| **gurî [II]** | 1. cureyekî nexweşiya çêrm a ku endamê gurî her dixwire û qalik dide 2. kesê ku bi vê nexweşiyê ketiye *"kesî qala guriyî nedikir, rabû di devê kaniyê de gû kir" |
| **-gurî bûn** | bi nexweşiya xwiranê ketin |
| **gurîkî** | 1. weke guriyan2. bi çepelî |
| **gur kirin** | 1. alaf pê dan2. agir geş kirin |
| **gurkî** | 1. weke guran 2. bi êrîşeke hovane *"bixwe gurkî, rabe mêrkî" |
| **gurmij** | hucûm, êrîş |
| **gurmijîn/digurmije/bigurmije** | hucûm kirin, êriş birin ser |
| **gurmist** | kulm, mist |
| **gurz** | 1. baqeke mezin a giyayê dirûtî û xuromkirî2. çekeke cengî ya ku dişibihe şiveke serçomax a mezin lêbelê hesinî û pîjpîjî ye |
| **-gurz kirin** | 1. (giya) weke baqeke mezin bi keys kirin2. (bar) par bi par bi- lind kirin |
| **gustik** | di por de rewşa qatqatîbûnê |
| **gustîl** | xemla ku dikine tiliyan |
| **guşpan** | guzvan |
| **gut bûn** | 1. (di av û heriyê de) çikilîn 2. (bi kûrî û hûrî di ramanê de) hênijîn |
| **guv** | (di zimanê zarokan de) 1. erebe 2. makîne |
| **guva guva** | hêdî hêdî |
| **guvaştek** | alava ku mêweyan diguvişîne û jê ava wan derdixe |
| **guvaştin/diguvişîne/biguvişîne** | 1. pihêt girêdan2. vepincirandin 3. şidandin |
| **guveguv** | dengê erebe û makîneyan |
| **guwah** | dîtiyê buyerê yan jî bihîstiyê gotarê; govan |
| **guwahî** | karê ku dîtiyê buyerê yan jî bihîstiyê gotarê dike;govanî |
| **guzar** | geşt û seyran |
| **guzargeh** | bihur |

| | |
|---|---|
| **guzik** | gûşiyê berên dara qajê |
| **guzim** | 1. pihêt 2. muhkem û şidiyayî |
| **guzvan** | alaveke kincdirûyan e; guşpan |
| **gû** | gemara însên *"gû jî, ji gênim e" |
| **gûdele** | 1. kesê elewat û bêkêr 2. kesê qilêr |
| **gûgerîn** | cureyekî kêzikên ku ji gemarê gogan çêdike û digerîne |
| **gû kirin** | gemar kirin, rîtin |
| **gûlik** | cureyekî çêreyê ye û pijandî tê xwarin |
| **gûmez** | serbanê girover ê ku nîvçemberkî ye; qube |
| **gûmik** | ji aliyê hundir ve serê tiliyan |
| **gûn** | 1. reng 2. boyax |
| **gûnî** | çêreyeke bistrî ya û dikine ardefa êgir; gonî |
| **gûse** | dasî |
| **gûsî** | 1. xurnûk 2. cureyekî giyayê bistrî ye gûstêr kevirê esmanî gûstêrk cureyekî bihukan e û şevê pê dikevin gûşî çiqilekî tijî yê tiriyan; enqûd |
| **gûz** | gêz *"bextê mêran gûza pûç e û pireya şikestî ye" |
| **gûzan** | hesinê tûj ê ku pê pirça çêrmî tê kurkirin |
| **gûzek** | cot hestiyên ku di her kêlekên piyên mirovan de ne; gêzik |

# H

| | |
|---|---|
| **h/H** | tîpa dehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê ezmandevî û qirikî ye, awayê belavbûna wê nîvdengdêr e |
| **ha! [I]** | çi ye |
| **ha [II]** | kîteyeke ku di wateya/wergire/yê de tê bikaranîn (ha ji te re) |
| **ha … ha … [III]** | ew jî dibe û a din jî dibe *"ha di hûr de, ha di tûr de" |
| **hacet** | 1. alav, halet 2. pêdivî *"barê hacetan, kes nikare rast bike" |
| **haf** | 1. huzûr, pêşber 2. qad, meydan |
| **-di hafa Xwedê de** | di huzûre Xwedê de |
| **hal** | rewş, temtêl *"heke bêyî mala me, tu dê bibînî halê me" |
| **-halê kûçikan** | rewşa dijwar |
| **-ji halê xwe razî bûn** | qîma xwe bi rewşa heyî anîn |
| **-hal û wext xweş bûn** | maldar bûn |
| **halan** | 1. awaz 2. newaya bilind *"halana dilan, ji halana bayî xurtir e" |
| **-halan dan** | 1. awaz berz kirin 2. bi newayeke bilind qîjîn |
| **halet** | amûr, alav |
| **-haletên avasaziyê** | alavên înşaetan |
| **halxweş** | 1. dewlemend2. têrxwarî |
| **han [I]** | 1. teşwîq 2. niç, navtêdan |
| **-han dan** | 1. teşwîq kirin2. nav tê dan, niçandin |
| **han [II]** | kîteyeke ku wateya cînavkên şanîdanê xurt dike wek: ew/ev wê/vê mala han |
| **handêr** | 1. teşwîqkar 2. navtedayî, niçandî |
| **hanê** | ha, han |
| **hangaj** | kotanê ku sewalan davêjinê û pê erdê cot dikin |
| **hanzûka** | pir bi lezgînî |
| **har [I]** | zordest |

| | |
|---|---|
| **har [II]** | kesê ku bi nexweşiya hişalozî û hoviyê ketiye, derdeseyî |
| **-har bûn** | 1. hov bûn, wehşî bûn 2. dîn bûn 3. ji rê derketin *"jina bêkes har dibe, mêrê bêkes jar dibe" |
| **-har kirin** | 1. hov kirin 2. axozî kirin 3. newan kirin4. dîn kirin û ji rê derxistin |
| **hasilat** | 1. derhat 2. hilberîna ku tê berhevkirin |
| **haş** | 1. sakin, aşt 2. tebitî |
| **-haş bûn** | 1. aşt bûn, sakin bûn 2. tebitîn |
| **-haş kirin** | 1. aşt kirin 2. tebitandin 3. asayî kirin |
| **haşa** | derî hafê |
| **-haşa ji huzûrê** | derî hafa camêran |
| **haşiye/haşî** | nivîsên li kêleka rûpelê |
| **hatin/tê/bê [I]** | 1. bûn 2. rûdan 3. qewimîn *"hat ji newalê, bû xwediyê malê" |
| **-hatin holê** | 1. qewimîn2. rûdan 3. çêbûn |
| **hatin [II]** | dexl û debar |
| **hator** | mîrkutê ku kils pê tê kutan |
| **havên** | meya, firşik, hevîrtirş*"bê havên, şîr to nagire" |
| **-havên bûn** | meyîn |
| **-havên kirin** | meyandin |
| **havil [I]** | 1. sûd, kelk 2. meslehet, berjewendî |
| **havil [II]** | bandor, tesîr |
| **havil [III]** | 1. biryar 2. pêwendî |
| **havildar** | pêwendîdar |
| **havî** | 1. sersar û axozî, derbider û aware 2. dînik 3. peza ku ji keriyê xwe vediqete û digihêje keriyekî din |
| **havî bûn** | derbider bûn |
| **havî kirin** | derbider kirin |
| **havîn** | werza germê, tavistan*"her çi jar e, li havînê jî sar e" |
| **havîngeh** | malên ku havînan tên bikaranîn; sermiyan |
| **havlêk** | gêzî, siqayîl |
| **havrî** | bermaya xwarin û vexwerinê |
| **hawar** | 1. îmdad 2. bangawaziya ku pê destyarî ji cihekî tê xwestin |

| | |
|---|---|
| **hawar hatin** | ji bo kesê di tengavîyê de destyarî hatin |
| **hawar gihandin** | rewşa aliyê di tengaviyê de ragihandin aliyê destyar |
| **hawar kirin** | 1. (bi dengî, nivîskî an ji bi riya ragihandinê) destyariya lezgîn daxwaz kirin 2. qîjîn û gazî kirin |
| **hawir** | doralî |
| **hawirde** | bûjenên ku ji derve hatine standin; îdxalat |
| **hawirdor** | dorhêl |
| **hawirparêz** | dorhêlparêz |
| **hawîd** | palanê ku davêjin ser pişta hêştiran |
| **hawran** | puşiya bêmil a ku di ser kincan de tê werkirin |
| **haxam** | keşeyê cihûyan |
| **hay** | 1. xeber 2. salix 3. melûmat 4. agehî *"zikê têr, hay ji yê birçî tuneye" |
| **-hay jê hebûn** | 1. haj pê hebûn 2. pê hesîn 3. pê nasîn 4. tê gihiştin*"ber bi mino, hay jê tuno" |
| **haydar** | 1. pêhesiyayî 2. xeberdar 3. têgihiştî |
| **haydan** | bergirî |
| **haydar bûn** | 1. pê hesîn2. jê xeberdar bûn 3. tê gihiştin |
| **haydar kirin** | 1. pê hesandin2. jê xebardar kirin 3. sergihayî kirin |
| **haylime** | teqereq |
| **hazir** | 1. amade 2. eywez*"behsa gur dikin, gur jî hazir e" |
| **heb** | 1. lib 2. kit |
| **-heb ji hebê neqetandin** | bênavber yeko yeko li pey hev rêz kirin |
| **heba** | 1. beytu 2. dêrzbûyî |
| **heba bûn** | dêrz bûn |
| **heba kirin** | dêrz kirin |
| **heban** | derdanka ku xwarina şivên tê de tê danîn; eyarê şivaniyê |
| **-hebana xwe vajî kirin/ daweşandin** | 1. bi qasî zanîna xwe axaftin 2. bi qasî hêza xwe tev gerîn |
| **hebirman** | hinarê hişkirî |

| | |
|---|---|
| **hebişandin/dihebişîne/bihebişîne** | 1. vegemirandin2. bi çavçilî daqurtandin |
| **hebosan** | cureyekî çêreya ku jê eraqê jî çêdikin |
| **hebreş** | mendika toraqê |
| **hebûn/heye/hebe** | 1. xwedî bûn 2. berdest bûn 3. giyanewer bûn*"çiya, bi ser hev re hene" |
| **hebûn-nasî** | retkoka ku sedema hebûnê wekî armanc dibîne |
| **hec** | di rojên wê yên diyar de serdana Mala Xwedê*"hec, bi silavan qebûl nabe" |
| **hecel** | derhata aborî |
| **hechecik/hecîreşk** | cuyekî çivîkên ku dişibihe leqleqan; dûmeqesk |
| **heciqandin/diheciqîne/biheciqîne** | pelixandin |
| **heciqîn/diheciqe/biheciqe** | pelixîn |
| **hecivandin/dihecivîne/bihecivîne** | tevizandin |
| **hecivîn/dihecive/bihecive** | tevizîn |
| **heciz** | gerew, barimte |
| **heciz kirin** | gerew girtin, barimte kirin |
| **hecî** | kesê ku di rojên tawafê de çûye serdana Mala Xwedê |
| **-hecî poşman** | 1. kesê ku hanzûka ji sozê xwe vedigere2. kesê ku hanzûka ji tewbeya xwe vedigere |
| **heç** | 1. şop 2. tûş |
| **-dan ser heça xêrê** | di riya qenciyê de meşîn |
| **-di heça nebaşan de têk** | çûn tûşî nepakan hatin û ziyaneke xedar dîtin |
| **heçî** | darekî devçeqel ê ku wekî Y'yekê ye û bi serê werisan ve dikin *"heçiyê feqîran, qelişî ye" |

| | |
|---|---|
| **-heçî lê qelişîn** | tûşî bêyomiyekê hatin û feşk li karê sewirandî ketin |
| **heçî ku (her çi ku)** | 1. her kî hebe 2. her çi hebe*"heçî ku li hespê hevalan siwar e, herî peya ye" |
| **heçik** | heçî |
| **heçko** | ma qey |
| **hed** | tixûb, sînor |
| **-hedê xwe zanîn** | hay ji sînorê tevgera xwe hebûn |
| **hedar** | 1. biryar 2. tebat3. aştî |
| **hedirîn/dihedire/bihedire** | 1. biryar wergirtin2. tebitîn 3. aşt bûn |
| **hedîs** | hemû gotin, kirin û çespandinên ku bê derew ji Cn. Pêxember eleyhiselam hatine ragihandin |
| **-hedîs riwayet kirin** | (ji Cn. Pêxember eleyhiselam) salixên rasteqîn ragihandin |
| **hedîse** | bûyer, rûdan |
| **hedûr** | bilîn, haşî |
| **-hedûra xwe anîn** | pê bilîn û haş bûn |
| **hedûrî** | aramî û aştî |
| **-hedûrî pê anîn** | bêhna xwe pê fireh kirin |
| **hefidandin/dihefidîne/bihefidîne** | nixamtin û veşartin |
| **hefidîn/dihefide/bihefide** | nixumîn û heyibîn |
| **hefik** | qurtik, gewrî |
| **hefsar** | 1. bendê serê heywanan ê bê devgem 2. rêvebiriya kar û baran*"bûk li ser hespê ye, |
| **hefsar** | li destê wê ye, hê jî kes nizane qismetê kê ye" |
| **hefsûdan** | cureyekî çêreya ku dikine nava toraqê; mendik |
| **heft** | 1. hejmara piştî şeşan û beriya heştan 2. jimareya7'an *"heft çîrokên hirçê hene, her heft jî ser hermiyê ne" |

| | |
|---|---|
| **-heft bavan jê dûr bûn** | qet têkiliyeke eqrebatiyê helal pê re nebûn |
| **heftane** | destheqa keda heft rojan |
| **Heftbira** | komstêra ku bi heft stêrên xwe ve wek çoçikê ye; Termê Merxê |
| **hefte/heftî** | her heft rojên demê |
| **heftek** | ji heft paran parek |
| **heftem(-în)** | di rêza heftan de |
| **hefteyî** | her heft rojan carekê |
| **heftê** | 1. deh heb heft 2. jimareya 70'î |
| **heftok** | lîstikeka ku bi beran tê lîstin |
| **heftreng** | keskesor |
| **heftûzk** | kînor |
| **heftyar** | keftar *"heftyar, bi axiftina xweş ji kunê derdikeve" |
| **heger** | heke, ger |
| **hej [I]** | 1. çiqilekî darê 2. giyayekî stûr û peraş î wekî çiqilekî darê |
| **-hejek di stûyî de dan** | çiqilekî serperaş di stûyî de werkirin |
| **-bi hejan agir vemirandin** | bi çiqilekî serperaş agir damirandin |
| **hej [II]** | 1. leq 2. liv 3. lerz û ricaf *"rovî nediçû qulê, hej dida teriya xwe" |
| **hejale** | 1. eware 2. lawaz3. pejmûrde 4. yax |
| **hejandin/dihejîne/bihejîne** | 1. bi ba kirin 2. lerizandin 3. leqandin4. ji cih livandin |
| **hejar** | 1. feqîr, xizan 2. bêkes, belengaz |
| **hejarî** | 1. feqîrtî 2. bêkesî |
| **hejde** | 1. hejmara beriya nozdehan û piştî hefdehan2. jimareya 18’î*"hejdehê adarê, milyaket hatin xwarê, gazî kirin biharê" |
| **hejesor** | sincîd |
| **hejhejok** | 1. sist, xav 2. livlivok, leqleqok |
| **hejik** | çiqilên ziravik ên badayî |
| **hejijîn/diheji je/bihejije** | 1. weşweşîn, milmilîn2. qirqilîn |

| | |
|---|---|
| **hejîn/diheje/ biheje** | 1. bi ba bûn 2. leqîn 3. lerizîn4. livîn *"çiya, bi hejînê hilnaweşe" |
| **hejîr** | cureyekî fêkiyan e |
| **hejmar** | reqem, jimare |
| **hejmartin/di hejmêre/ bihejmêre** | 1. jimartin2. bireqem kirin |
| **hekandin/di hekîne/bihek îne**1 | . kolan 2. lê gerîn |
| **heke** | eger, ger, ku *"heke deşt e, heke zozan e, rêberê pêz şivan e" |
| **helal** | tiştê ku Xwedê kirina wî azad kiriye *"kes ba helal, ji karkeran re ava zelal e" |
| **helal bûn** | ji aliyê Xwedê de azad bûn *"heram, ji çu kesî re helal nabe" |
| **helaltî** | rewşa helalbûnê*"bingeha hevaltiyê, bawerî û helaltî ye” |
| **helal kirin** | ji aliyê Xwedê de azad kirin |
| **helale** | guleke sor e |
| **helan** | cureyekî kevirên ku zû tê darotin |
| **helandin/dih elîne/bihelîn e**1 | . bi tîna germê herikbar kirin 2. rehn kirin 3. binevat kirin |
| **helar** | pîta êgir |
| **helaw** | 1. xwarineke ku ji ard, rûn û şêkir tê çêkirin2. şirînayî *"helaw, ji şîrêzê çênabe" |
| **helbest** | xebata wêjeyî ya ku ristên wê kin in û li bin hev tên rêzkirin; şiêr |
| **helbestvan** | nivîskarê helbestan; şair |
| **helboqe** | xelboqe |
| **hele [I]** | 1. xeletî 2. çewtî |
| **hele [II]** | nêçîra bi komekî |
| **helebez** | 1. bi lezgînî, bi leza bê 2. karê ku li ser piyan û bê tidarek hatiye amadekirin |
| **helecan** | tepîna dilî |
| **helekok** | cureyekî çêreya çolê ye *"diyariya şivên, helekok e" |
| **heleşe** | kesê xemsar ê ku her çi bikeve destan xirab dike |

| | |
|---|---|
| **helisandin/dihelisîne/ bihelisîne** | 1. virçiqandin û tepisandin hev 2. (dirûvê resen) guherandin û wergerandin tiştekî din |
| **helisîn/dihelise/bihelise**1 | . virçiqîn û tepisîn hev 2. (dirûvê resen) xera bûn |
| **helî** | 1. nîvî 2. nivîşkan3. ne gewherî |
| **helîn/dihele/ bihele** | 1. bi tîna germê herikbar bûn 2. rehn bûn 3. (resenî) winda bûn *"berf dihele, erd dimîne" |
| **helîse** | tiştê ku hatiye guherandin û wergeriyaye hêvîrê wî tiştî |
| **-helîseya kartolan** | kartolên ku piştî kelandinê kirine pestîl |
| **helkehelk/hilkehilk** | 1. bi zorî hildan û dayîna henaseyê 2. bi rev û bez |
| **helmet** | 1. hucûm, êrîş 2. çalakî |
| **helperest** | 1. ezperest 2. berjewendîperest |
| **helwest** | 1. temtêl 2. rewş 3. rayîş 4. bertek |
| **-helwesta hevpar** | di tevgerê de yekitî |
| **-helwest girtin** | bertek nîşan dan |
| **hem [I]** | pêşgireke ku wateya tevahiyê dide peyvê, mînak: hemvelatî |
| **hem [II]** | dualiyê dide hevokê, mînak: hem şaş e hem jî faş e |
| **hema** | 1. di wê heyamê de, tafilê 2. ewqas jî têrê dike3. xem nake *"bipêje, hema hê jî birêje" |
| **hemam** | serşoka gelemper*"hemam, bi tir û fisan germ nabe" |
| **heman** | 1. eynî 2. wekî ya din |
| **-di heman katê de** | di eynî saetê de |
| **hemandin/dihemîne/bihemîne**1 | . çît kirin 2. ji bo ku qedexetiya tiştekî diyar bibe li dorê qûç û diyarde danîn |
| **hemayîl** | nivişta ku davêjin stûyî |
| **hember [I]** | 1. dij 2. aliyê din, muqabil |
| **-li hemberî min** | muqabilî min, pêşpalî min |

| | |
|---|---|
| **hember [II]** | hevraz |
| **hember [III]** | bergind, bergîdan |
| **hembêz** | paşil, paxil |
| **hembêz kirin** | paşil kirin |
| **hemd** | pa û pesna ji bo Xwedê |
| **hemdem** | 1. hevdem, hevçax2. heval |
| **hemdemîtî** | 1. hevdemtî, hevçaxîtî 2. hevtementî |
| **hemete** | 1. muhafeze 2. berevanî |
| **-ji bo hemeteyê** | ji bo her îhtimal û bilaniyê |
| **hemete kirin** | 1. muhafeze kirin 2. berevanî kirin*" xwe ji moriya kulek hemete bike" |
| **hemî** | hemû *"hemî çêlek tên dotin, hemî gotin nayên gotin" |
| **hemû** | 1. gişt 2. bêkêmasî*"hemû mêr, nabin şêr" |
| **hemwate** | di heman mehneyê de; hevmehne |
| **hemwelatî** | di heman welatî de kesayetên civakê; |
| **hevwelatî** | , memleketî |
| **hemzik** | 1. ji heman zikî(xwişk û bira) 2. cureyekî xwarina kurdî ye |
| **hemzir** | kerê biçûk ê xurt |
| **henarîn/dihenêre/bihenêre** | hinartin |
| **henase** | 1. nefes, neks, 2. bêhn |
| **henc** | (r) nîşaneya bendikê ya ku di navbera du peyvan an hevokan de tê danîn, (-) |
| **hence** | 1. cihê qetînê yî zirav 2. cihê tenik ê ku şikestina wî nêzîk e |
| **-li ser henceyekê ye** | 1. ber mirinê ye 2. ber hilweşîn û rûxînê ye 3. hema dike ku bikeve 4. di xetereyê de ye |
| **hendef** | 1. cihê ku pêşveçûn tê de xetere ye û pir kûr e; hence 2. kendalê kûr ê bi xetere |
| **henderan** | 1. qurbetî 2. bêganetî 3. penaberî |
| **hendese** | zanista endazyariyê; mîmarî |
| **hene** | ecîneke ku tiliyên bûkê pê tên rengkirin |
| **henek** | 1. tirane 2. tinaze3. laqirdî *"henekê wî henekê hirçan e" |

| | |
|---|---|
| **henekbaz** | 1. laqirdok, 2. tiranekar |
| **henek kirin** | 1. galte pê kirin 2. laqirdî pê kirin |
| **-henek pê kirin** | pê tirane kirin, laqirdî pê kirin |
| **heng [I]** | mêşşa hingiv, mêşhingiv |
| **heng [II]** | di artêşê de desteyeke pir giran e |
| **hengame** | 1. sûresat 2. heys û beys |
| **hengkuj** | cureyekî gulan e |
| **hengur** | şevereş |
| **hepik** | alaveke tevn-raçandinê ye; kergît |
| **heq** | 1. maf 2. biha 3. deman*"cêr nû ye, kes nabêje heqê wî çi ye" |
| **Heq Teala** | **-** Xwedê Teala |
| **heqaret** | neheqî |
| **heqaret lê kirin** | **-** neheqî lê kirin û biçûk xistin |
| **heqdest** | 1. mehane 2. destmiz |
| **heqîbe** | 1. xurcik 2. kîs3. heban |
| **her** | 1. gişt 2. bi berdewamî |
| **-her car** | tim, hemasa |
| **-her çawa** | bi çi awayî hebe |
| **her çend** | **-** her çiqas |
| **-he çiqas** | çi miqdar hebe |
| **her dem** | **-** 1. her çax 2. her wisa |
| **-her gav û du gav** | tim û hemasa, bi minasebet û bê minasebet |
| **-her ji çi be** | sedem çi be |
| **-her kes** | mirov giş *"her kes, gurê roja xwe ye" |
| **-her tim** | her dem, her çax *"kêm kêm bixwe, her tim bixwe" |
| **-her tişt** | bêkêmasî heyber gişt |
| **her û her** | **-** heta hetayê |
| **-her wekî din/hwd** | hemû tiştên ku dişibihin vê rewşê wekî wê tên hesibandin |
| **hera** | 1. pirtir 2. dîtir 3. bêtir |

| | |
|---|---|
| **-hera bedew** | (mêza) bedewtirîn |
| **heram** | 1. qedexeyên Xwedê Teala 2. qirej û mirdar*"jina bi mêr, mêr di ser re heram e" |
| **heram bûn** | 1. (ji aliyê Xwedê de) qedexe bûn2. qirêj û mirdar bûn*"Behra Wanê, bi devê tajiyekî heram nabe" |
| **heramî** | 1. qedexebûyî 2. diz, çilfis *"çil heramî, nikarin rûtekî bişêlînin" |
| **heran** | çol û berî |
| **heraret** | 1. tîn 2. sênc 3. germahî |
| **heraş** | keça xama |
| **herbilandin/ diherbilîne/b iherbilîne** | (bend) li hev alandin |
| **herbilîn/dihe rbile/biherbil e** | (bend) li hev alîn |
| **herc û merc** | keft û left |
| **hereşe** | tehdîd, gef û gur |
| **hereşe lê kirin** | 1. tehdîd kirin 2. gef û gur lê xwarin3. diran jê re sîqandin |
| **hereşo** | 1. teqereq 2. qîjevîj |
| **herewer** | movika ku du hestiyan digihîne hev |
| **herewez** | 1. paletiya nanoziko2. karê hevpar |
| **herewezî** | hevparî |
| **herewezî kirin** | bi hevparî tev gerîn |
| **herewezkar** | kesê ku bi awayekî hevpar hin karan digerîne |
| **herez** | aşît, şepe |
| **herêm** | dever, mintiqe |
| **herêmkî** | li gor mintiqeyekê; deverî |
| **herf** | tîp *"heger ders be, herfek bes e" |
| **hergavî** | bi awayekî domdar; daîmî |
| **herheyî** | heta hetayê; sermedî |

| | |
|---|---|
| **heridandin/diheridîne/biheridîne** | dil şikandin |
| **herifandin/diherifîne/biherifîne** | heriftin |
| **heriftin/diherêfe/biherêfe** | 1. rûxandin 2. hilweşandin |
| **herifîn/diherife/biherife**1 | 1. peritîn 2. pişirîn3. xera bûn |
| **herikbar** | rewan, carî |
| **çîrokeke herikbar** | **-** çîrokeke lihevhatî a bênavbir |
| **herikîn/diherihe/biherike** | 1. (av) kişîn û çûyîn2. bêastengî teşe girtin*"av, ber bi avaniyê ve diherike" |
| **herimandin/diherimîne/biherimine** | 1. berhewa kirin, berba kirin2. felişandin 3. qedexe kirin 4. dêrz kirin5. berevajî kirin |
| **herişandin/diherişîne/biherişîne** | 1. çêrmê ser spîldax kirin 2. qalikê ser jê birin 3. (rûmet) şikandin û birîndar kirin |
| **herişîn/diherişe/biherişe** | 1. çêrmê ser selixîn2. qalikê ser zede girtin3. (rûmet) şikîn û bêqedr bûn |
| **herî [I]** | xweliya ku bi avê nerm bûye *"jina neqenc, heriyeke sar e" |
| **-herî di dêst de bûn zêr** | her çi kirin jê qezenceke pir zêde bi dest xistin |
| **herî [II]** | 1. pirtir 2. dîtir3. bêtir |
| **-herî mezin** | (nêrza) mezintirîn |
| **herîkêl** | (piştî avdanê) kêlana zeviyên birincî di nav heriyê de |
| **herîkêl kirin** | (birinc) di nav heriyê de çandin |
| **herîrêtik** | 1. hezge 2. heriya herikbar |
| **herk** | 1. kişîna avê 2. gerîna gêrebayî |
| **hero** | 1. her roj 2. her dem *"bûka metê, hero li dawetê" |
| **hersim** | tiriha negihiştî; besîre, şilûr *"bav hersimê dixwe, diranê lawî diseqînin" |
| **herûm** | sewala ku asê dibe û diengire |

| | |
|---|---|
| **herwe** | 1. belaş 2. bêdirav |
| **hes** | 1. hîs, hest 2. sehek |
| **hesab** | 1. hejmarnasî 2. di kar û baran de bikaranîna reqeman 3. tedbîr*"heçî neke hesaban, dibîne ecêban" |
| **hesab kirin** | 1. tedbîra xwe kirin 2. jimartin*"hespê xwe nal bike, paşê riya xwe hesab bike" |
| **hesan** | kevirê tûjkirina alavên qutkirinê; xar |
| **hesan kirin** | 1. xar kirin2. tûj kirin |
| **hesibandin/dihesibîne/ bihesibîne** | 1. hejmartin2. nav lê kirin 3. texmîn kirin *"êvarê, hîv xwe roj dihesibîne" |
| **hesin** | madenê ku jimara wî ya atomî 26, giraniya atoma wî 55.847, siftiya wî 7.8, kurteya wî ya latînî Fe ye û di 1510 dereceyî de jî dihele *"hesinê kêrê ji hev û du be, ji hev û du naxwe" |
| **hesincaw** | alavên ji hêsinî |
| **hesinkar** | kesê ku hesinan li gorî endazeyekê ro dike |
| **hesinkêş** | lajwerdê ku hesin û polayê kaşî xwe dike |
| **hesk/hesik** | kefçiyê mezin ê ku xwarin pê tê tevdan û valakirin; kefçe*"dîzikê got: 'ez rind im'; heskê got: 'di te de digerim' " |
| **-heska nav malan** | kesê gerok û navmalagerî |
| **hesp** | lêsiwariya ku ji kerê mezintir e û nêrê mehînê ye *"dostê kevn, hespê zînkirî ye" |
| **-hespê sêwak** | hespê revo |
| **-hesp pê re bezandin** | pê re ketin pêşbirkê û hevrikiyê |
| **hesret** | 1. keser 2. xweziya dûr; bêrî |
| **-hesret kişandin** | ji zû de li benda tiştekî man û lewma axîn kişandin2. pir bêriyê kirin |
| **hest** | 1. hêza pêderxistina tiştên nedîtî yên ku bi sehekan tên zanîn wekî serma, çêj; hîs 2. hêza pêderxistina tiştên razber ên wekî evîn, kîn û hwd |
| **-hestên yekî birîndar kirin** | dil şikandin, gêwil şikandin, êşandin |
| **-hest pê kirin** | 1. hîs kirin2. tê derxistin |

| | |
|---|---|
| **hestan** | stranên koçik û dîwanan |
| **heste** | alava ku pê agir tê pêxistin; fendek |
| **hestem** | kevirheste |
| **hestiyar** | 1. hîstenik, bihîstyar2. dilşewitî |
| **hestî** | parçeyên sext ên ku di lêş de ne û giyaneweran li piyan digirin *"ji ber segan, namîne hestiyên kewan" |
| **-hestiyê hinarike** | hestiyên ku di her du aliyên rû de ne |
| **-hestiyên qorikê hatin jimartin** | bûn kelaxê rût |
| **hestîhêr** | 1. hestîkoj 2. bi hêrs û rik |
| **hestîn/dihest e/biheste** | 1. tê derxistin 2. hîs kirin |
| **hestîvk** | bêrika ku nanê firinê pê tê derxistin |
| **hesû** | heşû |
| **hesûd** | 1. dexes 2. çavnebar3. kumreş |
| **heş** | dermanekî alazkî hêşîn ê ku êşên dêv û diranan dibire |
| **heşandin/dih eşîne/biheşî ne** | 1. dagirtin 2. tijî kirin |
| **heşaş** | 1. beşûş, devbiken2. rûgeş |
| **heşifandin/di heşifîn/ biheşifîne** | (dema nivîsandinê) midad belav kirin |
| **heşr** | 1. roja mehşerê 2. sûresata giran |
| **-heşr û neşr** | 1. roja hesabdana qiyametê 2. pir zêde, mişt tijî |
| **heşt** | 1. hejmara piştî heftan û beriya nehan2. jimareya 8'an |
| **heştek** | ji heşt paran parek |
| **heştem(-în)** | di rêza heştan de |
| **heştê** | 1. deh heb heşt 2. jimareya 80’yî |
| **heştirme** | sewaleke lingdirêj, bibask û girs a ku di erdnîgariyên germ de dijî, baskên wê bi kêrî firînê nayên lê pir beza ye |
| **heştpê** | ajaleke zeryayî ye; extebot |

| | |
|---|---|
| **heşû** | pembûyê ku di navîna rû û betên de tê bicihkirin |
| **heta** | bi qasî maweyeke dîyarkirî û carinan jî nediyarkirî*"heta ku co rast nebe, av tê re nakişe" |
| **-heta îro** | ji mêj ve ta niha |
| **-heta hetayê** | 1. her û her 2. bêdawî |
| **hetar** | pîşekarê kevirbiriyê |
| **hetav** | zerekiya tavê |
| **heter** | îsrar û pêkutî |
| **heter kirin** | îsrar kirin |
| **hetik** | rezalet |
| **-hetika yekî birin** | bêzar kirin |
| **hetikandin/dihetikîne/bihitikîne** | 1. rezîl kirin2. bizdandin 3. tengezar kirin |
| **hetikîn/dihetike/bihetike** | 1. rezîl bûn 2. bizdîn3. tengezar bûn |
| **hetîk** | îftira |
| **hetîketî** | 1. rezîltî 2. perîşanî |
| **hetrek** | 1. derba zexm 2. lêdana bi tundî |
| **hev** | 1. wateya tevahiyê dide peyvê 2. wekî pêşgir, navgir û paşgir tê bikaranîn û wateya tevahiyê dide peyva nû mînak: hevraz, serhevde, rastênhev |
| **heval** | 1. razdar 2. hogir, dost *"mêr ew e ku di rojên teng de li hevalê xwe dipirse" |
| **hevalbend** | 1. mutefîq 2. tagir 3. alîgir *"li bajêr peldankê te hebe, li gundan mirovê te hebe û li riyan hevalbendê te hebe xemgîn mebe" |
| **hevalbendî** | 1. îtifaq 2. tagirî 3. alîgirî *"hevalbendî, nameşe bi bêbextî" |
| **hevalcih** | zarok an jî têjikê ku bi hevalekî ve hatiye dinyayê; cêwî |
| **hevaltî** | 1. hevpişkî 2. hogirtî |
| **hevanî** | ewanî |
| **hevbajar** | hemşehrî |
| **hevbend** | li kêleka hev |
| **hevbend kirin** | dan rû hevpîşe hev |
| **hevbeş** | şirîkê di heman qadê de |

| | |
|---|---|
| **hevbiha** | bi heman biha û nirxî |
| **hevcar** | kotanê cotkirinê |
| **hevcure** | bi heman rengî |
| **hevçerx** | hemzeman û hevtemen; hevdem |
| **hevde** | 1. hejmara piştî şazdehan berî hejdehan2. jimareya 18’an |
| **hevdehem(-în)** | di rêza hevdehan de |
| **hevdeng** | bi heman awaz û newayê |
| **hevdil** | 1. razdar 2. di heman ramanê de |
| **hev dîtin** | 1. hev nasîn 2. pergî hev hatin |
| **hevedudanî** | (r) peyva ji du hêmanan pêkhatî |
| **hevenav** | (r) navdêra gelemper hevêrke çember, daîre |
| **-hevêrkeya cemsera bakurî** | çembera ku ji bo veqetandina kîşweran wekî tixûb tê pejirandin |
| **hevês** | 1. kefa dêst 2. binê pê |
| **hevîr** | 1. ardê bi avê strandî; ecîn 2. pestîl 3. helîseya her tiştê vîrçoqî*"kesî, hevîrê xwe bi kalî nexwariye" |
| **hevîrdiran** | merhema diranşûştinê |
| **hevîrtirş** | havênê hevîrî*"berf, hevîrtirşê erdê ye” |
| **hevkar [I]** | 1. şirîk 2. hevpîşe |
| **hevkar [II]** | 1. noker 2. sîxur 3. alîkarê neyêr |
| **hevkarî** | 1. karbeşî 2. şirîkatî |
| **hevkêşe** | 1. hevseng 2. terazû |
| **-hevkêşeyên navnetewe** | yî hevsengên gerdûnî yên di navbera gelan de |
| **hevling** | zilamên ku jinên wan xwişkên hev in |
| **hevnasîn** | nasîna du aliyan a bi hev û du |
| **hevnav** | 1. bi heman navî2. tişt an kesekî din |
| **-hevnavê min** | kesê ku navê wî wekî navê min e |
| **hevok** | (r) komeka peyvên watedar; cumle |
| **hevoksazî** | (r) bi awayekî rast rêzkirina peyvên watedar û peywirdar |

| | |
|---|---|
| **hevor** | nêriyê karxezalê |
| **hevpar** | 1. şirîk 2. hevkar |
| **hevparî** | 1. karbeşî 2. teqsîm |
| **hevpeyman** | 1. mutefîq2. sozdayî |
| **hevpeyvîn** | 1. sohbet 2. guftûgoya ku nûçegihanek bi kesekî têkildar re dike |
| **hevpîşe** | di heman sinaet û meslekî de hevalên hev |
| **hevran** | dan, genim û cehê ji bo xwarinê |
| **-mişkan hevranê yekî qul kirin** | keda yekî tûşî karesatekê hatin |
| **hevraz** | 1. sereberjêr 2. dibûr |
| **-hevraz bûn** | quloz bûn û bilind bûn |
| **-hevraz kirin** | quloz û bilind kirin |
| **hevrê** | 1. hevalê heman rê û dirbê 2. hevalê heman raman û bîrdoziyê |
| **hevrik** | reqîb |
| **hevring** | meqesa ku pê pez û berx tên birîn |
| **hevrist** | dareke bêber a ku belgên wê mînanî pîjan e û her dem kesk e; qaj*"hevrist ne dar e, nêrgiz ne bihar e, keç ne şûnwar e" |
| **hevsar** | hefsar, doxrişme |
| **hevser** | 1. jina mirovî 2. kita zoyekê |
| **hevsî** | cîran |
| **hevşî** | 1. sûra dora malê2. sûra ku li dora guhera pêz tê jenîn |
| **hevşîre** | keça ku di zaroktiya yekî de ji heman çiçikî şîr mêtiye |
| **hevta** | 1. takêş 2. yekta, hinkuf |
| **hevûrî** | karê dusalî |
| **hew [I]** | 1. qet nabe 2. ji vir şundetir tu carî na |
| **-ez hew dixwim** | ez ji vir şundetir tu carî naxwim |
| **hew [II]** | derd, kul |
| **-hew dan** | (birîn) der bûn |
| **hewa** | 1. bûjena kîmyayî a ku giyanewer pê dijîn 2. tevgera kar û barên seqayî3. hilm û gilm; nefes |
| **hewadar** | 1. cihê ku ba jê digire û lê bêhn naçike2. servekirî, pêşvekirî |

| | |
|---|---|
| **hewal** | 1. nûçe 2. bûyer, rûdan *"kesê ne li malekê, nizane hewalekê" |
| **hewandin/dihewîne/bihewîne** | 1. êwirandin 2. sitirandin 3. xwedî kirin*“dil, dilan dihewîne” |
| **hewar** | hawar *"ne dixwim savarê, ne diçim hewarê" |
| **hewarî** | 1. hawarî 2. hevalbendên Cn. Îsa eleyhiselam |
| **-çûn hewariya yekî** | bezîn destyariya yekî |
| **hewce** | 1. pewist 2. lazim3. pêdivî 4. muhtac *"çiya jî hewceyî çiyan in" |
| **-ne hewce ye** | lazim nake |
| **hewcedar** | muhtac |
| **hewdel** | şorbeya êrd |
| **hewes [I]** | 1. laqirdî, henek2. tinaze |
| **hewes [II]** | 1. azwerî 2. awat *"dolab hebs e, teşî reqs e, neqş hewes e" |
| **heweskar** | dilxwaz |
| **hewêrde** | çivîkek e |
| **hewisandin/dihewisîne/bihesîne** | 1. lê temrîn dan kirin 2. amojandin |
| **hewî** | (ji yekê heta çaran) jinên ku bi heman mêrî re zewicîne |
| **hewîn [I]** | xwezî |
| **-hewîn hatin** | 1. pê re kêfxweş bûn 2. jê bêzar nebûn |
| **hewîn/dihewe/bihewe[II]** | 1. sitirîn, êwirîn 2. aşt bûn 3. sebr kirin, tebitîn |
| **hewisîn/dihewise/bihewise** | 1. kêfa xwe pê re anîn 2. dil bijandin tiştekî*"mezin reqisî, biçûk hewisî" |
| **hewl** | 1. xebat 2. teşebus |
| **hewl dan** | 1. xebitîn 2. mercên heyî bi kar anîn |
| **hewn** | aqil, hiş |
| **hewngir** | 1. hişyar 2. aqilmend |
| **hewnas** | serkêlindîkêş |
| **hewq [I]** | pîleya pêlekanê |

| | |
|---|---|
| **hewq [II]** | baxçeyê ku tê de sewze tên çandin |
| **hewran** | kinca bêmil a ku di ser de tê werkirin |
| **hewreban** | di avahiyan de pêlekana hundirîn |
| **hewş** | 1. sûra li pêş an jî dora malan 2. hêwana malê *"heta ku dîk mîr be û tajî kizîr be, tu mêvanan li derê hewşê nabînî" |
| **-hewş di hev de bûn** | bûn cîranên nêzîk |
| **hewşan [I]** | cureyekî çêreyê ye û jê gêzî tên çêkirin |
| **hewşan [II]** | havînan dema razanê ya li pêşiya malên ku li dorê sûreke jenandî heye |
| **hewşeng** | 1. qad 2. qada tiratê |
| **hewtik** | baxçe |
| **hewtim** | sedeqe, xêr |
| **hewtî** | 1. tebat 2. tewan |
| **-hewtiya yekî birin** | 1. bi ser re dan avêtin 2. hêza tewana yekî qedandin |
| **hewz** | çala jenandî ya ku avê berdidinê û piranî li ber kaniyan çêdikin |
| **hey [I]** | daîmî |
| **-hey û hey** | 1. timî û daîmî 2. hê jî |
| **hey [II]** | geh, carinan |
| **-hey li jorê ye û hey li jêrê** | carinan li fêzê ye û carinan jî li xwarê ye |
| **hey [III]** | di wê navberê de |
| **-hey min dît ku winda bûye** | paşê pê hesiyam ku berze bûye |
| **hey [IV]** | baneşaneke gazîkirinê ye, î |
| **-hey lawo tu biqurçimî** | î kuro tu bimirî |
| **heya [I]** | heta |
| **-heya niha** | heta vê qasê |
| **heya [II]** | hesta şermkirinê; ifet |
| **heyam** | 1. dem 2. çax, wext *"heyam heye li deverinan, heval çêtir e ji biran" |
| **heyas** | serê tiliyên piyan |

| | |
|---|---|
| **heyase** | kembera navê a xemilandî |
| **heyat** | 1. jiyan 2. sûra li dora malê *"sibatê, guran xwe avête heyatê" |
| **heyber** | tiştê ku hebûna wî teqez e lê dibe ku bê zanîn an jî neyê zanîn |
| **heyberî** | berbiçavî |
| **heye ku** | dibe ku |
| **heyet** | 1. lijne 2. deste |
| **heyf** | 1. mixabinî 2. tol û întiqam 3. evez *"heyfa serê ku çû" |
| **-heyfa min bi te tê** | li te têm rehmê û gunehê min bi te tê *"heyva ronî! heyfa min bi te tê ku şeva reş li pey te ye" |
| **-heyf e** | cihê mixabinê ye/daxê ye |
| **-heyf hilanîn** | 1. tol hildan2. evez jê standin |
| **heyibandin/ diheyibîne// biheyibîne** | 1. tuneyî kirin 2. binevat kirin 3. dizîka şandin cihekî nediyar |
| **heyibîn/diheyibe/biheyibe** | 1. tuneyî bûn 2. binevat bûn 3. dizîka çûn cihekî nediyar |
| **heyirandin/diheyirîne/ biheyirîne** | şaşwaz kirin, mehtel hiştin |
| **heyirîn/diheyire/biheyire** | şaşwaz bûn |
| **heylê** | (mêza) heywax! |
| **heylo** | (nêrza) heywax! |
| **heyran** | delal |
| **-na heyran** | na delalê min/na qurban |
| **heytandin/diheytîne/ biheytîne** | 1. (da ku bike an neke) lê qîrîn 2. lome lê kirin |
| **heytehol** | 1. hêwirze 2. sûresat 3. şulixî |
| **heytehol kirin** | şulixî kirin, heylime kirin |
| **heyv** | cismê esmanî yê ku bi şev ronahiyê dide erdê; hîv *"wexta ku feqîr diçine diziyê, heyv ji êvar de derdikeve" |

| | |
|---|---|
| **heyveron** | 1. ronahiya heyvê 2. heyva çardeşevî*"heyfa ciwaniyê ye ku pîrî li pey e, heyfa heyveronê ye ku şevereş li pey e" |
| **heywan** | ji bilî mirovan ruhberên şênber ên ku di xwezayê de dijîn; sewal, ajal *"heke ku tu dixwazî kurê xwe bikî mêr, bike şivan; lê zû bîne mal, hê ku nebûye heywan" |
| **heywax!** | baneşaneke keserê ye |
| **heyz** | gîraniya jinan ya ku elameta wê dîtina xwîna malzarokê a mehane ye |
| **-heyz bûn** | (jin) ketin kirasan, ketin kincan |
| **hez** | 1. evîn 2. hebîn |
| **-hez kirin** | 1. hebîn 2. evîndar bûn *"hezkirin çiqasî kin be, jibîrkirin ewqas dirêj dibe" |
| **-jê hez kirin** | 1. hebîn 2. ji tiştekî/kesekî re dilinî bûn *"diz, ji tariyê hez dikin" |
| **hezandin/dihezîne/bihezîne** | 1. hejandin 2. leqandin 3. çelqandin4. ber bi ba kirin *"hezandin xweş e, lê bi du seriyan" |
| **hezar** | 1. deh heb sed 2. jimara 1000'î *"hezar dost kêm in, dijminek pir e" |
| **-hezar sond û selewat xwarin** | pir caran bi peyvên pîroz gotina xwe pesend kirin |
| **-ji hezarî yek** | kêm caran û ne her tim/degme caran |
| **hezaz** | ji binî ve herikîna axê; hezek |
| **hezek** | cihê bi herî û gil |
| **hezge** | hezek *"ker ker e, di hezgeyekê de dikeve heriyê, heft salan di wir re naçe" |
| **hezrîng** | hesinê daxkirinê hê 1. hîn, hîna 2. heta niha jî *"berxê çê, hê li ber kozê kifş e" |
| **hêç [I]** | qe, hîç |
| **hêç [II]** | har û dîn |
| **hêçan** | 1. ceribandin, ezmûnkirin 2. meqaleya wêjeyî |
| **hêçandin/dihêçîne/bihêçîne** | 1. ceribandin 2. ezmûn kirin |
| **hêdî** | 1. ne zû 2. sivik sivik *"ava hêdî hêdî, me ecêb jê dî" |
| **hêdîka** | 1. ne zûka û bi pêgiranî 2. dizîka |
| **hêja** | 1. birûmet, birêz 2. layîq *"mirî ne hêjayî şînê ye ku mirov jê re şînê bike" |
| **hêjatir** | 1. birêztir 2. layîqtir*"gilî heye, ji hezar giliyî hêjatir e" hêjî hêja hêjîr hejîr *"adetên bav û bapîran, kerik xweştir in ji hêjîran" |

| | |
|---|---|
| **hêk** | 1. adana firindeyan a ku di nav qalikekî req de ji spîtkekî û zerdikekî pêk tê 2. tovê hin ajalan e û jê têjik çêdibin *"roj tê, hêk ji hêka mirovî xurtir dertên" |
| **-hêkên hesinî kirin** | ji sermayê qerisîn |
| **-(bûn) hêka kûsiyan** | bêsexbêr mezin bûn *"hêka genî di pûngalê de dimîne û hêka kûsiyan li meydanê" |
| **hêker** | pîşekarê hûnanê |
| **hêkerûn** | qeyxane |
| **hêkî** | hêker |
| **hêl** | 1. alî, ta 2. tax 3. tûş |
| **hêlan/dihêle /bihêle** | hiştin |
| **hêlanek** | rûnişteka hilawestî ya ku tê kilandin; kilekursî |
| **hêle** | 1. neçîra kew û çivîkan a bê çek 2. nêçîra bi komekî |
| **hêlekan** | kilekursî |
| **hêlik [I]** | hêlekan, hêleçan |
| **hêlik [II]** | gun *"dema ku hirç pîr dibe, kudikên wî bi hêlikên wî dilîzin" |
| **hêlincîn/dihêlince/bihêlince** | qilpikê lê girtin, hîqikê pê girtin |
| **hêlî** | neynik, eynik, awêne |
| **hêlîlar** | xêzikên nîgaşî yên ku çembera cîhanê bi dirêjahî dibirin |
| **hêlîpan** | 1. rastênhev 2. xêzikên nîgaşî yên ku çembera cîhanê bi berahî dibirin |
| **hêlîn** | 1. malika çivîk, teyr û tilûran a ji pûş û pelaşî2. lan *"hêlîna teyrê kor jî, Xwedê çêdike" |
| **hêma** | 1. elamet 2. nîşane |
| **hêman** | 1. binke, bingeh2. unsur |
| **-hêmanên bingehîn** | unsurên esasî |
| **hêmayî** | 1. elametkî 2. nîşankî |
| **hêmin** | 1. asûde 2. mulayim3. awirşikestî |
| **hêmî [I]** | kelik û potikên kevnare |
| **hêmî [II]** | bi rutûbet û têhn; şil, |

| | |
|---|---|
| **hêncirandin/ dihêncirîne/ bihêncirîne** | 1. hingaftin û çîrçîrî kirin 2. vecûtin û vehêrandin |
| **hênijîn/dihê nije/bihênije** | 1. telexewî bûn 2. ber bi xewê ve çûn 3. pokinîn 4. ponijîn |
| **hênik** | 1. ne sar ne jî germ2. şîrogermî 3. mûtedîl |
| **hênikahî** | 1. şîrogermîtî2. îtîdala hewayê |
| **hênik bûn** | 1. sarogermî bûn 2. (hewa) mûtedîl bûn |
| **hênik kirin** | 1. bi bajen an jî basarkê tîna hewaya heyî şikandin 2. (bi pîneyekî şil) tîna laşê germ daxistin 3. bi êgir qerma sermayê şikandin |
| **hêran/dihêre /bihêre** | 1. kotin 2. pişirandin 3. cûtin 4. hûr kirin *"kûçik kûçik e, dema ku hestiyan dihêre, hesabê qûna xwe jî dike" |
| **hêratî** | destmala ku jin di ser mêzerê de didine ser eniyên xwe |
| **hêre** | jûra ku aîdî jinan e û mêrên biyanî nakevinê |
| **hêrik [I]** | erdê bi kevir |
| **hêrik [II]** | sewala ku hirî yan jî muyê wê rast û zivir e |
| **hêris** | zana û keşeyê cihûyan; haxam |
| **hêrs** | 1. rik 2. en(g)ir 3. gir *"hêrs tê çav lê reş dibe, hêrs diçe rû lê reş dibe" |
| **-bi hêrs** | 1. bi rik 2. bi engir3. bi gir |
| **-bi hêrs bûn** | 1. rik hatin2. en(g)irîn 3. gir hatin |
| **hêrsok** | 1. rikhatî 2. en(g)irî 3. girik |
| **hêsa** | 1. vehisî, rawestyayî2. ne zor, asan |
| **hêsa bûn** | 1. rawestîn 2. asan bûn |
| **hêsan** | 1. asan, ne zor 2. tiştê ku zûka bi dest dikeve |
| **hêsanî** | asanî, ne bi zorê |
| **-bi hêsanî** | bi awayekî zû û asan |
| **hêsî [I]** | belekiyên berfê yên ku ji ber bayî civiyane hev |
| **hêsî [II]** | erdê ku mêrg û zeviyên wî dêm in |
| **hêstir [I]** | ava ku di dema girîn û çavşewitînê de ji çêv datê xwarê; rondik*"ji çavên kor, hêstirên sor nayên" |
| **hêstir [II]** | sewala ku ji têkiliya navbera hesp û keran de çêdibin û mêhîniyên wan nazên*"hêştir radibin hev, hêstir û ker di bin lingên wan de têk diçin" |
| **hêşî [I]** | berfa ku ji ber bayî di çalan de kom bûye |
| **hêşî [II]** | sîwana ku di kêlekên konan de tê hiştin |

| | |
|---|---|
| **hêşîn** | rengê ava zeryayê û hewaya çiksayî |
| **hêşînahî** | 1. çêre 2. sewze*"rewşa biharê, hêşînahî ye" |
| **hêşîn bûn** | (çêre û dar) aj dan û bejn avêtin *"çi ku havînî hêşîn dibe, ew zivistanî jî lazim dibe" |
| **hêşîn kirin** | (çêre û dar) çandin |
| **hêşînkew** | rengê têvel ê ji spî, kesk û şîn |
| **hêştir** | cureyekî ajalên sehrawî ya barkêş e; wekî pêz goştê wê tê xwarin, tê dotin û birîn |
| **hêt** | beşa lingî ya ku ji moka çongê heta kulîmekê ye |
| **hêtûn** | kilsxane |
| **hêvişandin/dihêvişîne/bihêvişîne** | 1. parastin2. hemete kirin 3. cangiranî kirin *"her kes derpiyê xwe bihêvişîne, dê birîna li pişta xwe bibîne" |
| **hêvişandî** | 1. parastî 2. hemetebûyî *"malê hêvişandî, ne xurê xwediyî ye" |
| **hêvî** | umîd, bendeman*"tiştê bi nîvî, jê meke hêvî" |
| **-hêvî jê hatin birîn** | dest jê hatin şûştin *"hêvî, ji Xwedê nayê birîn" |
| **-li hêviyê man/sekinîn** | 1. li bendê man 2. di raçaviyê de man 3. çav lê çûn |
| **hêvîdar** | umîdwar, bendewar |
| **hêvîs kirin** | (gore, leşik, xalîçe û hwd ên qulbûyî) tehmîr kirin |
| **hêvojkarî** | 1. perwerdehî2. amojkarî |
| **hêvotin/dihêvoje/bihêvoje** | 1. perwerde kirin2. tembîh kirin 3. şîret kirin |
| **hêwl** | sehm |
| **hêwer** | tiyê bûkê |
| **hêwlnak** | tiştê ku mirovî ditirsîne û vediciniqîne |
| **hêwirandin/dihêwirîne/bihêwirîne** | êwirandin |
| **hêwirîn/dihêwire/bihêwire** | êwirîn |
| **hêwî [I]** | hewî *"hêwî malê dikin, jintî malê dibin" |

| | |
|---|---|
| **-hêwî hate ser** | mêrê wê jineke din jî li xwe mehr kir |
| **hêwî [II]** | hêmî û rutûbet |
| **hêz** | 1. quwet, taqet 2. qudûm 3. desthilatdarî |
| **-bihêz** | 1. xurt 2. jîr 3. desthilat |
| **-bi hêz bûn** | 1. di xwe de qudûm dîtin 2. xurt bûn3. desthilat bûn |
| **-bi hêz kirin** | 1. xurt kirin2. hatin hawarê 3. destyarî jê re kirin |
| -**hêzên ewlekeriyê** | beşa asayîşê a artêşê |
| **-hêzên avî** | beşa asayîşa zeryayî |
| **-hêzên bejayî** | beşa asayîşa erdê |
| **-hêzên hewayî** | beşa asayîşa hewayî |
| **-hêzên seqayî** | beşa asayîşa fezayî |
| **hêzar** | 1. qumaşê ku jinên misilmanan li ser kincan de li xwe werdikin 2. çarşev |
| **hibr** | aviya rengîn a ku pê tê nivîsîn; murekeb, midad |
| **hiçhar** | îsota sor a tozkî |
| **hikmet** | bîs û razên pêkhatina kar û tevgeran |
| **-hikmeta îlahî** | razên ku Xwedê di tiştên pêkhatî de bi cih kiriye |
| **hil-** | (r) pêşgireke lêkerçêker e û wateya berbijoriyê didê |
| **hilanîn/hiltîne/hilîne** | 1. bi dest xistin 2. bilind kirin 3. veşartin*"Silto bû kebanî, golika werisî hilanî" |
| **hilav** | ader û eslpak |
| **hilavêtin/hildiavêje/hilavêje** | 1. lotik avêtin 2. bi ser re baz dan |
| **hilawestin/hildiawêse/hilawêse** | daliqandin |
| **hilberandin/hildiberîne/hilberîne** | 1. îmal kirin2. çêkirin |
| **hilberîner** | 1. îmalker 2. çêker |

| | |
|---|---|
| **hilberîn** | îmal |
| **-navgînên hilberînê** | amûrên îmalkirinê |
| **hilbestîn/hildibeste/hilbeste** | girêdan, bestin |
| **hilbijartin/hildibijêre/hilbijêre** | 1. bijartin 2. (ji nav re yek an hinek) ecibandin 3. (deng) bi kar anîn |
| **hilbijêr** | 1. bijartî 2. dengdayî3. ecibandî |
| **hilbûn/hildibe/hilbe** | 1. ji şûnê rabûn 2. qetîn 3. (agir) pê ketin 4. berz bûn |
| **hilciniqandin/hildiciniqîne/ hilciniqîne** | 1. veciniqandin2. zil kirin3. silikandin |
| **hilciniqîn/hildiciniqe/hilciniqe** | 1. veciniqîn2. zil bûn 3. silikîn |
| **hilçinandin/hildiçinîne/hilçinîne** | (tiştê ziwa) av kişandin xwe |
| **hilçinîn/hildiçine/hilçine** | 1. mêtin û vexwarin2. (çaviya filitî) kaşî rêzê kirin 3. bijartin |
| **hilçûn/hildiçe/hilçe** | 1. ber bi jorê çûn 2. di kêrtê de qelibîn xwarê |
| **-hilçûna derûnî** | aloziya nefsî ya ku ji ber bertekekê pêk tê |
| **hildan/hildide/hilde** | 1. bi dest xistin 2. (ji erdê û jêrê) bilind kirin |
| **hilêvirî** | amana bê dervank |
| **hilêvirîn/hildiêvire/hilêvire** | devê tiştê devgirtî vekirin |
| **hilfirîn/hildifire/hilfire** | 1. hilperîn 2. silikîn 3. ji xewê veceniqîn 4. ji cihê xwe pekîn |
| **hilgerîn/hildigere/hilgere** | 1. (ber bi jor) bilind bûn 2. berê xwe dan jorê 3. çûn zozanê |

| | |
|---|---|
| **hilgirtin/hildi gire/hilgire** | 1. wergirtin, hildan2. bilind kirin 3. mil kirin, pişt kirin 4. (birîn) werimîn û kêm girtin *"mirov barê xwe |
| **hilnegire** | , kes barê mirovî hilnagire" |
| **hilhatin/hiltê /hilê(hilbê)** | 1. (cismên esmanî) hatin xuyanê 2. heytandin*"bihar hat, zivistan hilat" |
| **hilhilî** | hizhizî, hoşhopo |
| **hilhilok** | cureyekî fêkiyên çolê ye û dişibihe gêlasan |
| **hilikî** | sewala ku pêşwext hatiye dinyayê *"hilikî çand û viringî ket" |
| **-hilikî zayîn** | (sewal) zû gon xwarin û zû zayîn |
| **hilisîn/dihilis e/bihilise** | 1. (bêyî hemdê xwe) di aliyekî de tehisîn 2. (pê) şemitîn |
| **hilketin/hildi keve/hilkeve** | 1. rabûn 2. raperîn3. (ber bi jor) bilind bûn 4. pê re mijûl bûn |
| **hilkêşan/hild ikêşe/hilkêşe** | 1. (ber bi jor) bilind kirin 2. quloz kirin |
| **hilkêş û dakêş** | rabûn û daketina lemperên zeryayê; med û cezr |
| **hilkirin/hildi ke/hilke** | 1. qurifandin 2. jê kirin3. pê xistin *"êgir bi darên hûr hilke" |
| **hilkişandin/ hildikişîne/hi lkişîne** | hilkêşan |
| **hilkişin/hildi kişe/hilkişe** | 1. (ber bi jor) bilind bûn 2. quloz bûn |
| **hilkutan/hild ikute/hilkute** | 1. vegevizîn 2. bi zextî mêtin |
| **hilimîn/dihili me/bihilime** | 1. henase hilkişandin û dakişandin 2. gulimîn |
| **hilm** | 1. bixar 2. dûkel 3. nefes 4. gilm *"hesinê germ, bi hilmê germ nebûye" |
| **hilmaştin/hil dimaşe/ hilmaşe** | 1. vemaliştin2. bi keys kirin *"serê xwe şûştiye û eniya xwe |
| **hilmaştiye** | , diçe nav dijmin tu dibêjî qey aştî ye" |
| **hilme** | 1. hucûm, êrîş 2. devjeniya tund |
| **-hilmeyî yekî kirin** | 1. hilbaskî yekî bûn, êrîş birin ser 2. pê re ketin devjeniyeke tund |

| | |
|---|---|
| **hilmeşîn/hildimeşe/hilmeşe** | hilkişîn |
| **hilmijîn/hildimije/hilmije** | 1. nefes hildan û dan 2. mêtin 3. hilçinîn |
| **hilo** | 1. de rabê! 2. de bazdê û xwe bigihînê! |
| **hilpekandin/hildipekîne/hilpekîne** | 1. pengizandin2. hilfirandin |
| **hilpekîn/hildipeke/hilpeke** | 1. hilfirîn 2. pengizîn |
| **hilperişîn/hildiperişe/hilperişe** | bêhnijîn |
| **hilpesirîn/hildipesire/hilpesire** | 1. li hember yekî sekinîn 2. (hevîr) dema pehtina wî hatin3. (xurek) dema xwarina wî hatin |
| **hilqehilq** | îskeîska di dema girîn an jî vereşanê de |
| **-hilqehilq kirin** | (di girîn an jî vereşanê de) îskeîsk kirin |
| **hilqefşandin/hildiqefşî-/hilqefşîne** | 1. (da ku rind bitepise hev) hejandin2. (da ku giranî bê fehmkirin) hejandin |
| **hilqûm** | qirik |
| **-hilqûma mirinê** | dema sekeratê |
| **hilsengandin/hildisengîne/ hilsengîne** | 1. nirxandin2. tehlîl kirin, ferisandin |
| **hilteqilandin/hilditeqilîne/ hilteqilîne** | 1. leqandin, hejandin 2. hilqefşandin |
| **hilteqilîn/hilditeqile/hilteqile** | 1. leqîn, hejîn2. hilqefşîn |
| **hiltirandin/hilditirîne/hiltirîne** | 1. tûş bûn, gayîn, sihirandin 2. tecawuz kirin |

| | |
|---|---|
| **hiltirîn/hilditire/hiltire** | 1. hatin sihirandin2. aşofîn |
| **hilû [I]** | alûçe |
| **-hilûreşk** | alûçeyên reş |
| **-hilûzerk** | alûçeyên zer |
| **hilû [II]** | 1. meht û bêgirnoz2. şimşat |
| **-hilû kirin** | 1. girnoz jê darotin 2. şimşat kirin |
| **hilweşandin/hildiweşîne/hilweşîne** | 1. xera kirin 2. kavil kirin 3. bêhavil hiştin 5. rûxandin |
| **hilweşîn/hildiweşe/hilweşe** | 1. rûxîn 2. rijîn 3. kavil bûn 4. bêkêr bûn*"dîwarê rast, hilnaweşe" |
| **himbiz** | li ba hev û pir, ji hev ne firk |
| **-daristana himbiz** | daristana ku darên wê li kêlekên hev û pir in |
| **himbizî** | rexhevî û pirî |
| **hin** | 1. piçek û ne gişt 2. parçeyek 3. jê beşek *"jinê bîne ji mala mezin, li pey bide hezar û hin" |
| **hinar** | cureyekî fêkiyan e |
| **hinarde** | bûjenên bazirganî yên ku dişînin welatekî din; îxracat |
| **hinare** | 1. peyama nivîskî yan jî devkî 2. şandek |
| **hinarik** | her du hestiyên ku li kêlekên rûyî ne |
| **hinartin/dihinêre/bihinêre** | 1. şandin 2. bi rê kirin |
| **hinartî** | şandî, qasid |
| **hinav** | 1. endamên di hundirên giyaneweran de 2. hundirê cendêk *"ê ku ne ji hinavan, nayê pêş çavan" |
| **-bijîşkiya hinavê** | bijîşkiya endamên hundirîn |
| **-hinav kutan** | bi ser hev henase dan û hildan |
| **hinavkutî** | tengenefesî hincet 1. behane, mehne2. mazeret |

| | |
|---|---|
| **hincirandin/ dihincirîne/bihincirîne** | 1. gincirgincirî kirin 2. hetikandin3. aşofandin |
| **hincirîn/dihincire/bihincire** | 1. gincirgincirî bûn 2. hetikîn 3. aşofîn |
| **hind** | 1. kêlek, rex, tenişt2. cem, li ba |
| **hindam** | qam, bejn û bal |
| **hindav** | 1. îstiqamet 2. dûş |
| **hindik** | 1. nezêde 2. kêm*"ji piran pir diçe, ji hindikan hindik" |
| **hindikahî** | 1. kêmayî 2. kêmar |
| **hinek** | 1. çendek 2. peşkek3. pirtikek *"hinek dikin, hinek dixwin" |
| **-hinekan pifî guhan kirin** | ji bilî niçandin û navtêdana xelqê serwext nebûn |
| **hing** | dem, heyam *"kengî bibare, wê hingê zi-vistan e" |
| **hingaftin/dihingêve/bihingêve[I]** | 1. zecirandin2. lê dan *"dema hingavtina kerê tê, nanê cotyarî dixwe" |
| **hingaftin/dihingêve/bihingêve[II]** | 1. di cihê nîşankirî de lê xistin 2. gihandin îstiqameta rast |
| **hingijtin/dihingêje/bihingêje** | bi awayekî çavtarî xwe avêtin nava tiştekî |
| **hingil** | çiçik |
| **hingiv** | adana şirîn a ku mêşa hingivî ji puxteyên kulîlkan hildiberîne û di kewareyan de dimeyîne*“peyva nebaş, bi sê pat hingivî nayê xwarin” |
| **hingî** | 1. ewçend 2. ji wê demê virdetir |
| **hingorî** | maweya zemanî ya ji tarîbanê hetanî dema razanê |
| **hingûlîsk** | gustîl |
| **hingûr** | mexreb |
| **hinkuf** | 1. hevser 2. hevtayê yeksanî tayê din |
| **hiqûq** | mafên zagônî |
| **-hiqûqa navneteweyî** | zagonên ku têkiliyên di navbera gelan de têkûz dikin |

| | |
|---|---|
| **-hiqûqa giştî** | zagonên kar û barên cemawerî |
| **hiqûqnas** | pisporê zanistên zagonî |
| **hirç** | cureyekî ajalên çolê yî çarpê ye û dirinde ye*"guran xwariye, lê hirç mane" |
| **hirî** | pûrta pêz û hêştiran |
| **hirmî** | cureyekî fêkiyan e |
| **hiş! [I]** | baneşaneke hişyarkirinê ye |
| **-hiş bûn** | **1**. deng nekirin2. dengê xwe birîn |
| **-hiş be!** | dengê xwe meke |
| **hiş [II]** | 1. aqil, serafet 2. hafize, bîr *"kesê hiş li sêrî, namîne li pişt dêrî" |
| **-hiş çûn** | 1. aqil tev li hev kirin 2. ketin sergêjiyê |
| **hişk** | 1. zexm 2. ziwa 3. sext 4. qayîm 5. çilmisî*"agirê xweş, agirê darê hişk e" |
| **-hişk û hola** | 1. çilmisî û ziwabûyî 2. tiptenê |
| **hişkahî** | 1. zexmtî 2. ziwahî3. sextî, tundî 4. qayîmtî 5. çilmisîbûn |
| **hişkav** | cihê ji bej û avê pêk tê |
| **hişkavî** | bejavî |
| **hişkawiz** | çinîna pêşwext |
| **hişk bûn** | 1. ziwa bûn 2. zexm bûn 3. sext bûn, tund bûn 4. qayîm bûn5. çilmisîn 6. mirin |
| **hişkebawerî** | 1. baweriya ku tewandina wê ne hêsan e 2. baweriya ku guherîna wê ne pêkan e |
| **hişkegilê** | girêka ku bi hêsanî venabe; girêhişk |
| **hişkekuxik** | kuxika sext a ku wekî xeneqûtkê dikeve gewriyê |
| **hişkesalî** | sala ku zivistana wê pir sar e û bihara wê jî bêbaran derbas dibe |
| **hişkî** | 1. hişkahî 2. reşesermaya bê ba û barij |
| **hişk kirin** | 1. ziwa kirin2. zexm û berk kirin 3. karê xwendinê terikandin4. qayîm kirin û şidandin5. çilmisandin6. kuştin |
| **hişmendî** | 1. biaqilî 2. xwedîferasetî |
| **hişsivik** | 1. saf, sefêk 2. dînik |
| **hiştin/dihêle /bihêle** | 1. terikandin 2. destûr dan |
| **hişyar** | 1. jîr 2. jêhatî3. kesê ku ne xewar e |
| **hişyarî** | 1. îxtar, îqaz 2. danezan 3. jîrî û jêhatîtî4. xewarnebûn *"heye teqdîra Barî, feyde nake hişyarî" |

| | |
|---|---|
| **-hişyariya dawî** | agehdarkirina ji bo cara paşîn |
| **hişyar kirin** | 1. îxtar kirin, îqaz kirin 2. ji xewê rakirin 3. pê hesandin4. pê dan zanîn |
| **hizr** | 1. fikr û raman 2. qinaet |
| **-hizr kirin** | 1. ramîn 2. texmîn kirin |
| **hîcab** | awayê lixwekirina jina misilman a li hundir û derve |
| **hîç** | qet/qe |
| **hîçparêz** | kesê ku têkoşîna hemberî dijwariya jiyanê bêwate dibîne |
| **hîçparêzî** | retkoka ku mirovî û kesayeta wî dispêre lawaziya li hemberî têkoşînê |
| **hîle [I]** | bîz, mehde |
| **-hîleyê xwe jê kirin** | qirqalê wî hilnedan |
| **hîle [II]** | fend û fût |
| **-hîle û xurde li dorê nebûn** | dûrî dek û dolavan bûn |
| **hîlebaz** | dekbaz |
| **hîlor** | dara ziqûmê |
| **hîm** | 1. xîm 2. esas 3. bingeh 4. tar |
| **-hîm danîn** | 1. xîm avêtin2. tar jênîn |
| **hîmat** | tiştê ava û pêkhatî |
| **-hatin hîmatê** | hatin pê, pêk hatin |
| **hîn** | hê, hîna *"hîn ga tune, êfir çêdike" |
| **hîn bûn** | 1. elimîn 2. fêr bûn |
| **hînbûyî** | 1. elimî 2. fêrbûyî*"hînbûyî, ji harbûyiyan zortir in" |
| **hîndarî** | perwerdeya bi riya ezmûnan; temrîn |
| **hîndekar** | 1. mamosteyê ku di zanîngehê de perwerdekariyê dike 2. amojkar3. rawêjer, hêvojkar*"hînbûyiyan hîn meke, hîndekeran ji bîr meke" |
| **hîndekarî** | 1. pîşeyê perwerdekariya di zanîngehan de 2. amojkarî 3. hêvojkarî |
| **hîn kirin** | 1. perwerde kirin2. elimandin 3. hêvotin 4. fêr kirin 5. amojandin *"min xelq |
| **hîn kire** | govendê, êdî kesî bi destê min negirt" hîqik îskeîska kesê ku parî di ber de maye |
| **hîqînî** | 1. dengê îskeîskê2. hîrînî |

| | |
|---|---|
| **-hîqînî pê ketin** | 1. hîsk hatinê 2. xwe zeft nekirin û bi dengî kenîn |
| **hîrîn/dihîre/ bihîre** | (hesp) şîhîn |
| **hîro** | cureyekî kulîkan e |
| **hîs [I]** | pêşzanîna heyberên razber; hest |
| **-hîs kirin** | hê di pêş de tê derxistin |
| **hîs [II]** | tenî |
| **-hîsê lê xistin** | bêhna dû û şewatê li xwarina pijandî xistin; bîsokî bûn |
| **hîsk** | îsk, hîqik |
| **hîş** | erdê ku xweliya wî rengê sorahiyê lê dixe |
| **hît [I]** | semax |
| **hît [II]** | kevirê ku bi destekî avêtina wî pêkan e |
| **hît [III]** | cureyekî bizinan e |
| **hîv** | cisma esmanî a ku bi şevê xuya dibe û ronahiyê dide cîhanê; heyv *"hîv bibe duşevî, her kes dê wê bibîne" |
| **hîvik** | hîva nû ya ku li esmên wekî tîpa C'yê tê xuyan; hîlal, lêvedas/hişkedar, nûma |
| **hîvî** | hêvî |
| **hîz** | 1. eyarê rûn 2. bêar û bêexlaq |
| **ho ho!** | baneşana ku pê ga tên ajotin û sekinandin |
| **ho ho kirin** | ga ajotin an jî dan sekinandin *"ho |
| **ho bike** | ku bila ga bisekine" |
| **hoçik** | kevirê meht ê ku bi qasî destekî ye, tehtik |
| **-hoçik lîstin** | bi keviran li dûdo xistin |
| **hodar** | 1. aj, şax, zîl 2. ajeroya çêre û daran |
| **hogeç** | beranê çarsalî |
| **hogir** | 1. dost 2. heval3. razdar |
| **hok [I]** | girêka ku zû û hêsan tê vekirin *"mar çiqasî hokan bide xwe, divê rast here qulê" |
| **hok [II]** | 1. gemara sewalan2. zîrça kewan 3. xozana peynkirî |
| **hoker** | (r) peyvên ku rewş û mercên pêkhatina lêkeran nîşan didin; amil |
| **hol [I]** | 1. meydan, qad2. hêwan |

| | |
|---|---|
| **-hol hola te ye** | firsend firsenda te ye |
| **hol [II]** | topa ji kulav an jî ji potikan çêkirî, gog |
| **holedest** | cureyekî lîstina gogê ye û her tofek ji şeş kesan pêk tê |
| **holepîtk** | pêtên agirê gur |
| **holetel** | cureyekî lîstina gogê ye û îro wekî goga amerîkayê tê naskirin |
| **holik** | malika textîn *"heke gur ji bagerê bitirsiya, dê ji xwe re holikek çêkira" |
| **holî** | şiva holetelê |
| **honî** | darên ku li gorî pîvanekê tên birîn |
| **horehor** | dengê girînê yî berz |
| **horehor kirin** | bi dengekî berz girîn |
| **horg** | dîwan, meclis |
| **horî** | ferişteyên bihuştê |
| **hoste** | pisporê pîşeyekî*"her tişt di destê hosteyê xwe de baş e" |
| **hov** | 1. kovî 2. mirov an jî desteya dûrî sincê mirovatiyê; wehşî |
| **hovberî** | hovîtî |
| **hovîtî** | 1. kovîtî 2. wehşîtî |
| **hovane** | 1. koviyane 2. wehşetnak |
| **hoy** | sedem |
| **hoyix** | kincên ku tijî pûş û pelaşdikin û ji bo tirsandina çivîkan di dîwarê bîstên de diçikînin |
| **hoykar** | sedemkar |
| **hoykarî** | sedemkarî |
| **hoz** | 1. qebîle, eşîr 2. lijne, deste |
| **hozan [I]** | 1. helbest, riste2. stranbêj |
| **hozan [II]** | 1. xwezan, arif2. nesebzan, nifşzan |
| **hozanvan** | helbestvan |
| **hucûm** | 1. êrîş 2. serdegirtin, helmet |
| **hucûm kirin** | 1. êrîşbirin ser 2. hilmeyî kirin |
| **huçik** | devmilên kincan |
| **hudhudk** | cureyekî çivîkan e |
| **hukim** | biryar, qerar |

| | |
|---|---|
| **hukimdar** | 1. serwer 2. desthilat |
| **hukumet** | 1. dewlet, dûgel2. rêvebiriya kar û barên cemawerî |
| **hundir** | 1. ne li derve, derûn2. hinav *"jin dîwarê hundir e, mêr dîwarê derve ye" |
| **-hundir çûn** | virikî bûn |
| **hundirandin/ dihundirîne/ bihundirîne** | 1. hewandin2. di xwe de girtin û avêtin hinavan |
| **hundirîn** | 1. tiştê ku ne aîdî derve ye, derûnî 2. daxilî |
| **huner** | 1. miharet 2. qabiliyet3. pîşe *"huner, xwediyan ezîz dike" |
| **-hunerên şêwekarî** | miharetên bedewiyê |
| **hunerdost** | dilxwazê kar û xebatên hunerî |
| **hunerî** | 1. miharetî 2. pîşeyî |
| **hur** | 1. azad 2. kesê ku çavên wî şaş in |
| **hur bûn** | 1. azad bûn 2. çav lê şaş bûn |
| **hur kirin** | azad kirin |
| **hureme** | 1. kirêt û bêbine2. bêqedr û nezan 3. kesê ku li gor rayîşa civakê tev nagere 4. şaşo |
| **hurim** | tirxes |
| **hurmet** | 1. giramî, rêzgirtin2. jina binamûs |
| **hûfik** | kuna ku di nava xilxileyên keviran de ye û li zozanan weke cemedankan tê bikaranîn |
| **-hûf kirin** | 1. pif kirin 2. bi carekî de daqurtandin |
| **hûn** | (r) cînavka kesane a ji bo kesên duyemîn ên pirjimar |
| **hûnandin/dihûnîne/bihûnîne** | 1. dan raçandin2. dan dirûvandin 3. dan rokirin |
| **hûnîn/dihûne/bihûne** | 1. bend li hev anîn û raçandin2. nivîs û bûyer dirûvandin 3. ro kirin |
| **hûr [I]** | mîde, asik *"hûr, ne têra kayê ye" |
| **-mal di tûr de û serî di hûr de** | bêwarê ku xem û tatêla wî têrbûna zikê wî ye |
| **-hûr berdan** | zik mezin kirin |

| | |
|---|---|
| **hûr [II]** | 1. biçûk 2. lixwenehatî3. kêmnirx *"hûr bifikire, dûr bifikire, kûr bifikire, şûr bifikire" |
| **-hûr û mûr** | kel û mel |
| **-diravê hûr** | 1. diravên ku nirxê wan kêmtir e2. diravên madenî |
| **-lê hûr bûn** | 1. bal dan 2. lê kolîn 3. mutale kirin |
| **-hûr nêrîn** | bi awayekî baş lê kolan |
| **hûrbijêr** | 1. ziravbihîstyar2. bisemt |
| **hûrde** | tiştên hûrik |
| **hûrdek** | tîpa ku hûr tê nivîsandin wek: a, b, c... |
| **hûrfilitî** | ziktêrdek, zikberçûyî |
| **hûrgilî** | 1. dorfireh 2. agehiya berfireh |
| **hûrik** | 1. biçûçik 2. xirdik, qamkinik 3. yax, eware *"hûrik hûrik, dagire tûrik" |
| **hûring** | pênûsa ji pûrta firindeyan |
| **hûr kirin [I]** | 1. qutqutî kirin 2. parçe kirin 3. pişirandin *"heke dilê şivên kete bişkulê, wê hûr dike û bi şîr dixwe" |
| **hûr kirin [II]** | 1. diravên gir bi yên hûr re guherandin2. diravek bi diravê dûgeleke din re guherandin |
| **hûrtirş** | silek û xurekxurê ku çi li ber keve dixwe |
| **hût** | 1. cinawirê efsûnî2. masiyekî pir mezin e *"ji xelqê re hût e, ji xwe re kût e, hevalê ticarê rût e" |
| **hwd** | her wekî din |

# I

| | |
|---|---|
| **i/I** | tîpa yazdehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdêreke kurt e, cîderka wê navderkî ye, di belavbûna wê de dev nîvgirtî ye û asta belavbûna wê bilind e |
| **iban** | (di zimanê zarokan de) qurban |
| **Iblîs** | şeytan *"ker Iblîs be, dermanê wî weris e" |
| **iblîsî** | şeytanî |
| **îcar** | vê carê, vê teqlê |
| **ilet** | 1. sedem 2. nexweşî3. înk |
| **-ji iletî yekî re tiştek kirin** | ji bo silkirina yekî tev gerîn |
| **-ketin iletê** | 1. ketin hevrikiyê2. engirîn |
| **ilm** | 1. zanist 2. agahî*"nezanî, dijî ilmê ye" |
| **ilmî** | 1. zanistî 2. xebata lêkolînî |
| **ilqênîn/diilqêne/biilqîne** | hîqik pê girtin |
| **Incîl** | pirtûka pîroz a ku ji Cn. Îsa eleyhiselam re hatiye hinartin |
| **ingir** | înk |
| **ingirandin/diingirîne/biingirîne** | 1. bihêrs kirin 2. xeyidandin |
| **ingirîn/diingire/biingire** | 1. asê bûn û înat kirin 2. bihêrs bûn 3. su hatin |
| **int** | nalîn |
| **intdar** | nalenalkirî |
| **inteint** | nalenal |
| **inteint kirin** | 1. nalenal kirin2. kerixîn 3. zor pê ketin |
| **intîn/diinte/biinte** | 1. ji yekî pekandin 2. nalenal kirin 3. zor pê ketin |
| **ireir** | inteint |
| **ireir kirin** | inteint kirin |
| **irq** | reh û bingeha neteweyekî; regez, nifş |
| **irs** | reha ku ji nifşên pêşiyê hatiye hildan |

| | |
|---|---|
| **irsî** | tiştên ku ji nifşên berê hatine wergirtin |
| **isad** | rêbir, eşqiya |
| **isadî** | rêbirî, eşqiyatî |
| **isandin/diisîne/biisîne** | 1. sêwirandin 2. ji ber girtin |
| **isîn/diise/biise** | 1. sêwirîn2. şibihîn |
| **isqinc** | behîvok, argûşk |
| **isqincî** | kesê ku argûşk di gweriya wî de hatiye |
| **-istan** | paşgirek e ku wateya cih û bergehê dide peyvê |
| **istêre** | cihê ku nivînên razanê lê tên jenîn |
| **iwaraş** | babîsok |

# Î

| | |
|---|---|
| **î/Î** | tîpa duwazdehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdêreke dirêj e, cîderka wê pêşderkî ye, di belavbûna wê de dev nîvgirtî ye û asta belavbûna wê bilind e |
| **î- [I]** | pêşgireke pêkanîna peyvên ku têkildarî deman e; mînak: îro, îsal... |
| **-î [II]** | paşgireke pêkanîna navdêran e; mînak: serî, kerî... |
| **î! [III]** | baneşeneke gazîkirinê ye; hey, ê |
| **-î hevalo Xwedê te ji bîr neke!** | hey hevalo ev qenciya te ji aliyê Xwedê ve bê xelatkirin! |
| **îbadet** | perestiş |
| **-îbadet kirin** | perestin |
| **îbret** | pend |
| **îbûdî** | rişwet, bertîl, qirt |
| **îca/îcar** | vê carê, vê teqlê |
| **îcad** | 1. hilberîna tiştekî nedîtî 2. pêkanîna karekî nû |
| **-îcad kirin** | (tiştekî nedîtî) hilberandin û pêk anîn |
| **îcaze** | 1. destûr 2. bawername3. buruntî |
| **îcazetname** | di medreseyan de bawernameya ku alimek dide feqîhê xwe |
| **îç** | înkarkirina tiştê kirî |
| **-îç kirin** | (tiştê kirî) înkar kirin |
| **îd** | eyd, cejn *"-ji tunedîtiyan re- danhêrk, îd e" |
| **îdam** | sezakirina tawanbarekî bi darvekirin û xeniqandinê |
| **-îdam kirin** | bi darvekirinê seza kirin |
| **îdare** | dolivgeriya kar û barên jiyanê |
| **îdare kirin** | 1. li gorî pêdiviyên jiyanê hereket kirin 2. zêde mesref nekirin3. deng ji îhmal û kêmasiyan re dernexistin |
| **îdî** | êdî |
| **îdxalat** | hawirde |
| **îfade** | 1. derbirin 2. bersivdana rapirsînekê |
| **-îfade kirin** | 1. daxwazek anîn zimên 2. (ji saziya têkildar re) bersiva rapirsîneke fermî dan |

| | |
|---|---|
| **-îfadeya yekî girtin** | 1. (wekî saziya fermî) ji kesê têkildar bersiva rapirsînê wergirtin 2. li yekî xistin |
| **îfet** | 1. namûs 2. heysiyet3. anor |
| **îflas** | têkçûna di karekî de |
| **-îflas kirin** | di karê xwe de bi ser neketin |
| **îftar** | fitar |
| **îhmal** | (bi qasî pêdiviyê) mijûlnebûna bi tiştekî re, beradan |
| **-îhmal kirin** | 1. bera tiştekî dan 2. beytu berdan3. bêhemal hiştin |
| **îhtiram** | rêz û giramiya ku ji kes an jî tiştekî birûmet re tê girtin |
| **îhtiyac** | hewcetî |
| **îkram** | 1. comerdiya ku ji yekî re tê kirin 2. bexşîş û diyarî |
| **-(tiştek) îkramî yekî kirin** | (tiştek) lê dan xwarin |
| **îlac** | bûjena ku ji bo bergiriya nexweşiyekê hatiye amadekirin; derman |
| **îlan** | 1. dengî 2. daxuyanî |
| **îlan kirin** | 1. bi dengî ragihandin2. ji raya giştî re dan xuyandin |
| **îlawe** | zêdehiya pêwist an jî nepêwist; pêvek |
| **îlave kirin** | 1. pê ve kirin2. lê zêde kirin 3. boçik pê ve girêdan |
| **îlon** | meha nehem a zayînî |
| **île** | girava biçûçik |
| **îltihab** | di lêş de cihê ku kêm û aviyeke zer tê de kom bûye |
| **-îltihab girtin** | kêm û aviyeke zerotankî di lêş de peyde bûn |
| **îm** | 1. ev 2. pêşgireke ku tê pêşiya peyvên têkildarî demê û /m/ya wê dikeve mînak: îcar, îro, îsal, îtir... |
| **îmal** | di karistanan de rêzehilberîna bujenan |
| **-îmal kirin** | 1. hilberandin2. çêkirin |
| **îmam** | 1. serwerê ji Ehlibeytê2. zanayê zanistên şerîetê |
| **îmamet** | 1. di nav endamên Ehlibeytê de serweriya kar û barên rêvebiriyê2. zanatiya zanistên şerîetê dinimîne |
| **îman** | baweriya bi dînekî ku ji aliyê Xwedê de hatiye hinartin *"sikûta zimên, silametiya îmanê ye" |
| **-îmana xwe avêtin** | li dadgehê bi derewî sond xwarin |

| | |
|---|---|
| **-îman kirin** | bawer kirin |
| **îmdad** | ji daxwazkirî re şandina hewariyê |
| **îmha** | tunekirina giştî |
| **îmkan** | 1. derfet 2. mefer |
| **îmsak** | 1. ji kesê rojîgir re dema destpêka rojiyê 2. berbang |
| **îmtihan** | di qadeke zanînê de ceribandina têgihiştina kesekî |
| **îmze** | şanenava ku ji ber navekî ve tê çîlovîlokirin |
| **-îmze kirin** | şanenav kirin |
| **în** | roja cumeyê |
| **înad** | înk |
| **-ketin înadê** | înk girtin, engirîn |
| **înan/tîne/bîne** | anîn |
| **încane/încare** | kûzika ku gul û kulîlk tê de tên çikandin |
| **încas** | hilûreş |
| **înç** | şik |
| **-înç kirin** | 1. şik birin 2. tê derxistin, sergihayî bûn3. pê hesîn |
| **înçkirî** | 1. şikbirî 2. serwext3. beled |
| **înk** | 1. kîn 2. en(g)r |
| **-ketin înkê** | 1. kîndar bûn2. engirîn |
| **-înk û bilah kirin** | bi tu awayî ji gotina xwe averê nebûn û ji bo vê yekê sond xwarin |
| **înkar** | nepejirandin |
| **-înkar û tune kirin** | nepejirandin û binevat kirin*"kenê kûçikan jî bi înkar û tunekirinê tê" |
| **înqilab** | sewre, şoreş |
| **însan** | mirov, merî *"însan dinyayê danaqurtîne, lê dinya însên dadiqurtîne" |
| **înşaet** | avahiya ku nû tê çêkirin |
| **-xîmê înşaetê avêtin** | dest bi avasaziyê kirin |
| **întiqam** | tol, heyf, evez |

| | |
|---|---|
| **înziwa** | destvekişandina ji kar û barên jiyanê |
| **îqaz** | hişyarkirina ji xetereyekê |
| **îqbal** | bext, siûd *"heke |
| **îqbal** | hate sêrî, her kes dibêje: 'aferî!' " |
| **îqlîm** | 1. av û hewa, kîşwer2. herêma erdnîgarî |
| **îqtibas** | agehiya ku ji dereke din hatiye wergirtin |
| **îqtisad** | kar û barên têkildarî rêvebirina jiyanê |
| **îro** | 1. roja ku em tê de ne2. a niha *"îro li ber derê me ye, sibehê li ber derê we ye" |
| **-îro ro** | di vê demê de |
| **-ji îro pê ve** | ji niha şunde |
| **îsal** | sala niha, vê salê |
| **-îsal misal** | salawext |
| **îsbat** | 1. birhan 2. peyt, delîl |
| **îsbat kirin** | 1. peyitandin2. birhan nîşan dan |
| **îsewî** | fileh |
| **îsil** | 1. çaviya di bin stêreyê nivînan de 2. di dîwaran de çaviya ku kel û melên hûrde dikinê |
| **îshal** | virikîbûn |
| **îsk** | hîqik |
| **îskan** | lîwana vexwarinê |
| **îskeîsk** | 1. dengê girîna bi hilkehilk 2. dengdana mirovê ku noqî ava sar bûye |
| **îskeîsk kirin** | 1. (ji ber girînê) hilkehilk kirin 2. (mirovê ku noqî ava sar bûye) pifepif kirin |
| **îslam** | dînê dawîn ê ku ji Cn. Muhemed eleyhiselamî re hatiye hinartin |
| **îsot** | cureyekî sewzeyên tûj e |
| **îsraf** | dêrz |
| **îstgeh** | 1. rawestgeh 2. sazî û destgeha weşanên dengî |
| **îstikan** | îskan |
| **îstiqamet** | 1. tûş/dûş 2. di erdnîgariyê de aliyên resen (bakur, başûr...) û pêkhatî (bakurê rojhilat, rojhilata navîn...) |
| **îstiqrar** | 1. aramî û huzûr2. ewlehî û asayî |
| **îstixbarat** | 1. salixgeriya sîxurî 2. agehiya nepen |

| | |
|---|---|
| **îş** | kar û xebat *"îşê meran xuyan nabe, car heye tûyan dixwin, car heye gûyan dixwin" |
| **-îşê nemayî anîn sêrî** | 1. pir eziyet lê dan kişandin2. êtixiyek anîn ber dêrî |
| **îşaret** | nîşaneya tiştê nimandî; hêma, diyarde |
| **îşev** | ev şev/vê şevê |
| **îşk** | şid |
| **îşkar** | 1. xebatkar 2. jêhatî |
| **îşkav** | sindoq |
| **îşk dan** | bar şidandin |
| **îşkence** | rêbaza azarkirina bi lêdanê |
| **-îşkence kirin** | bi lêdanê azirandin |
| **îşpêbûyî** | jîr û xebatkar |
| **îşxal** | vegirtina welatekî bi awayekî ku derî zagonên navneteweyî ye |
| **îtifaq** | (li ser kirin an jî nekirina karekî) di navbera çend aliyan de biryarên ku tên wergirtin |
| **-îtifaqa sêalî** | peymana ku di navbera du aliyên têkildar û aliyekî çavdêr de tê şanenavkirin |
| **-îtifaq kirin** | li hev kirin |
| **îtir** | 1. êdî 2. ji bilî îxracat hinarde |
| **îw!** | baneşeneke ecêbman û şermkirinê ye; wî!/pî! |
| **îzgeh** | îstgeh |
| **îzin** | destûra ku ji bo kirin an jî nekirina karekî tê dayîn |
| **-îzin dan** | destûr dan |
| **-îzin xwestin** | destûr û musaede xwestin |

# J

| | |
|---|---|
| **j/J** | tîpa sêzdehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke pêşezmandevî ye, di belavbûna wê de ziman li ser diranan dişide, fîzek û nerm e |
| **jahr** | jehr |
| **jaj** | cureyekî çêreya ku di çêjdana penîrî de tê bikaranîn |
| **jajerûn** | cureyekî xwarina ku ji jajî û rûn tê çêkirin |
| **jajî** | toraq û penîrê ku jajî kirine tev |
| **jakaw** | 1. wehşî 2. hov 3. kovî |
| **jale** | 1. kulîlka ziqûmê 2. xunav |
| **jan** | 1. êş 2. tajan *"jana hemû tiliyan yek e" |
| **-jana zirav** | cureyekî nexweşiyê ye û hêdî hêdî bi kuxika xwînî dikuje |
| **-jan dan** | 1. êşîn 2. tajan dan |
| **-jan girtin** | 1. êşê lê girtin2. tajan pê ketin |
| **janbir** | dermanê êşbir |
| **jandar** | 1. biêş 2. tajandayî |
| **janîn/dijane/ bijane** | ajinîn |
| **jano** | 1. nexweş 2. seqet |
| **jar** | 1. sefîl 2. bêkes 3. lawaz |
| **jarav** | bijûn |
| **jarav bûn** | 1. bijûn bûn2. paqij bûn |
| **jarav kirin** | 1. bijûn kirin2. aman ji aravê derxistin û aveke paqij bi ser de kirin |
| **jar bûn** | 1. sefîl bûn 2. bêkes bûn 3. lawaz bûn |
| **jarîn/dijare/ bijare** | 1. nalîn 2. zûrîn 3. girîn |
| **jar kirin** | hejar kirin |
| **jarxane** | jûra pêşalîkariya tenduristî |
| **jehr** | 1. bûjena ku sedemkarê nexweşiyê ye 2. bûjena ku sedemkarê mirinê ye *"jehra maran, ji maran naçe" |
| **jehrav** | av û jehra ku têkilî hev bûye |
| **jehrdar** | jehrîn |

| | |
|---|---|
| **jehremar** | jehra maran |
| **jehrîn** | 1. bûjena ku jehr tê geriyaye 2. bûjena ku tê de jehr heye |
| **jehr kirin** | 1. jehr lê dan xwarin 2. jehr tevî xwarina û vexwarina yekî kirin3. lê herimandin 4. di ber de kirin ziqûm |
| **jek** | xilindor |
| **jem** | 1. danê xwarinê 2. dem, zeman |
| **jenan** | pîşekarê ku bi lehîmê hesinên şikestî dicebirîne |
| **jenandin/dijenîne/bijenîne** | 1. (dîwar) dan lê kirin 2. dan şeh kirin 3. (hilm) dan hildan û berdan4. çirûsandin 5. dan zingezing kirin 6. dan lehîmkirin 7. (alavên mûsîqayî) dan lêxistin |
| **jeng** | bûjeneke qehweyî ya ku ji ber şilbûnê li ser rûyê hesinan peyda dibe; zeng |
| **jengar** | zengar, zengirtî |
| **jeng girtin** | li ser hêsin tebeqeyeke zengê çêbûn |
| **jenîn/dijene/bijene** | 1. (dîwar) lê kirin 2. şeh kirin3. (hilm) hildan û berdan4. çirûsîn 5. zingezing kirin 6. lehîm kirin7. (alavên mûsîqayî) lê xistin 8. (hestî) ajinîn |
| **jê** | ji wî/ji wê |
| **-jê pê ve** | ji niha şundetir |
| **jêbir** | alava ku nivîsê winda dike |
| **jê birin** | 1. xêzên nivîsandî winda kirin 2. di qimarê de qurût kirin |
| **jê birîn** | 1. ji heqdesta wî birîn 2. tûşî karesatekê hatin |
| **-Xwedê jê biriye** | Xwedê bobelatek aniye serê wî |
| **jêder** | 1. cihê ku mijar jê hatiye hilçinandin; makder, çavkanî 2. avzêm jêderk 1. çavkaniya avê2. makdera agahiyan |
| **jê gerîn** | 1. dest jê vekişandin2. serbest berdan |
| **jêgir** | îqtibas |
| **jê girtin** | 1. ji destê wî hildan 2. îqtibas kirin |
| **jê hatin** | 1. pêk anîn 2. bi dest xistin *"bila jê bihata, bila pêşî serê min bişkanda" |
| **jêhatinî** | qabiliyet jêhatî 1. jîr 2. egîd *"kebaniya |
| **jêhatî** | , bila nîvê qeliyê jî bixwe" |
| **jê kirin** | 1. qut kirin 2. birîn3. hilkirin *"li kerê mirî digere ku nalan jê bike" |
| **jêla** | ji aliyê jêrîn ve |
| **jêma** | 1. berma 2. mîrate |

| | |
|---|---|
| **jêmayî** | 1. bermayî 2. serata |
| **jêr** | 1. bin, bintar 2. qûntar3. (di erdnîgariyê de) aliyê başûr |
| **-li jêr** | 1. li bin, li bintarê2. li qûntarê 3. li başûrî |
| **jêrîn** | cihê li bin, aliyê li bintarê |
| **jêrla** | jêla |
| **jêrnivîs** | nivîsa ku li bin tê xuyakirin; têbinî |
| **jêrxanî** | 1. binanî 2. binesazî |
| **jêza** | 1. maka nifşê 2. makder |
| **ji** | daçeke e û wateya maweyeke diyar dide peyvê |
| **-ji ber** | di ber xwe de |
| **-ji ber ku** | bi sedema ku |
| **-ji berê de** | hê zû de |
| **-ji ber xwe** | xwe bi xwe |
| **-ji ber xwe de gotin** | derewa bêpere kirin |
| **-ji ber yekî ve** | li şûna yekî *"ciranê çê ji ber Xwedê ve digihêje hawariyê" |
| **-ji bilî** | ji xeyrî *"barê ketiyan kes ranake, ji bilî Xwedê" |
| **-ji dest hev revandin** | ji aliyê her kesî ve hatin xwestin |
| **-ji dêl ve** | 1. dewsa ku 2. beramberî |
| **-ji mêj ve** | 1. di berê de2. hê di zû de |
| **-ji nişkê ve** | bêyî sedemeke diyar û di wê gavê de |
| **-ji nû ve** | bi careke din |
| **-ji rikanî** | yekî ji bo hêrsa yekî bîne |
| **-ji rêzê** | asayî |
| **-ji sedî** | 1. ji hejmara sedî pareke diyar 2. rêjeya sedekê; (%) |
| **-ji xeynî/xeyrî** | tiştê navborî ne tê de |
| **ji ber çûn** | 1. (bi zarokeke mirî) berwext welidîn 2. (bi têjikeke mirî) berwext zayîn |
| **ji ber kirin** | di ber xwe de xwendin û gotin |
| **ji bestan gotin** | di ber xwe de gotegot kirin |
| **ji bîr kirin** | 1. ji balê avêtin 2. dest jê vekiandin*"her çiqas bibî mîr, xwe meke ji bîr" |

| | |
|---|---|
| **jih [I]** | têla saza musîqayî |
| **jih [II]** | 1. rûdiyê zirav 2. bendê ku ji rûdiya zirav tê bidestxistin |
| **jiha** | ziya, ejdeha |
| **ji hev zayîn** | li hev zêde bûn |
| **jij** | (di zimanê zarokan de) goşt |
| **jikarketî** | karnişîn |
| **jimar** | 1. hejmarên ji yekî heta nehan 2. reqem |
| **jimare** | 1. reqem 2. hejmar |
| **-jimareya cot** | reqemên wek: 2, 4, 6, 8, 10... |
| **-jimareya sereke** | reqemên ji 1'ê hetanî 9'an |
| **-jimareya şkestî** | reqema ku tê de piştî reqema tam yeke şkestî jî heye wek: 1.3, 3.05, 54. 33... |
| **-jimareya tam** | hemû reqemên ku li pey reqema sereke reqemeke şikestî nayê |
| **-jimareya tek** | reqemên wek 1, 3, 5, 7, 9... |
| **jimarnasî** | zanistên pisporiya wan têkildarî hesaban û jimartinê ye |
| **jin** | 1. mirova mê 2. hevsera mirovî *"axa jin û mêrî ne ji hev be, tev nagere" |
| **jinane** | 1. wekî mirova mê2. her tiştê têkildarî jinê |
| **jinap** | jina mamê mirovî; amojin |
| **jinbav** | hewiya diya yekî |
| **jinbira** | jina birayê mirovî |
| **jinebî** | 1. jina ku mêrê wê miriye 2. jina berdayî*"jinebî dibêjin: 'ez dizanim'; qîz dibêjin: 'tu dizanî' " |
| **jinik** | jin |
| **jinkok** | jina bêkêr a ku tenê navê wê jin e *"hin jin in û hin jinkok in" |
| **jintî [I]** | pîrektî |
| **jintî [I]** | jina birayê mêrê bûkê *"jintî bi hev re baş bin, bira dê neşaş bin" |
| **jinxal** | jina xalê mirovî; xalojin |
| **jixwe** | hema wisa |
| **jixweber [I]** | sirûştî, xwezayî |
| **jixweber [II]** | (ji bo karekî bihurî) nepêwist |

| | |
|---|---|
| **-tu jixweberê hatî** | pêdivî bi hatina te tunebû |
| **jiyan** | rewşa ruhberiyê a ku bi mirinê diqede; heyat |
| **-jiyana rojane** | jîna/heyata her rojê |
| **jiyar** | 1. heyata rojane 2. awayê domandina heyatê3. şaristanî |
| **jiyarî** | areza |
| **jiyîn/dijî/bijî** | 1. nemirin û heyata xwe berdewam kirin 2. ber xwe dan |
| **jî [I]** | daçekek e û wateyê xurt dike mînak: ez jî hatim |
| **jî [II]** | umir, temen |
| **jî [III]** | qews, kevan |
| **jîjo** | jûjî |
| **jîkele** | 1. nipnû 2. ter û taze |
| **jîn** | jiyan, heyat *"jin kaniya jînê ye" |
| **jîndar** | 1. candar, giyanewer2. nemirî |
| **jînenîgarî** | serpêhatiya kesekî ya di jiyanê de |
| **jîngeh** | cihê ku jiyana giyaneweran lê didome*“viran, ji tu kesî re jîngeh ava nekiriye” |
| **jîngehnasî** | zanistên ku pisporiya wan tenduristiya der û dorê ye |
| **jînşê** | 1. kesê ku dikare bijî 2. kesê ku dikare xwe ragire û nemire 3. berxwedêr |
| **jîr** | 1. biaqil 2. hişmend3. jêhatî 4. zîrek |
| **jîrane** | wekî/sezayî jîran |
| **jîrî** | 1. biaqilî 2. himendî3. jêhatîtî 4. zîrektî |
| **jîrek** | jîr |
| **jîrektî** | jîrî |
| **jîvan** | heyz |
| **jîy** | di lêş de rehên stûr |
| **jor** | 1. fêz 2. bilind *"çûçik çûçik e, gava avê vedixwe, jorî xwe li Xwedê dinêre" |
| **-li jorê** | li fêzê |
| **jorîn** | li fêzê |
| **jovan** | poşman |
| **jovan bûn** | poşman bûn |
| **jovanî** | poşmanî |

| | |
|---|---|
| **jûjî** | cureyekî sewalên pîjpîjî ye *"jûjî lepê xwe li çêlikên xwe dide û dibêje: 'periyên wan çi nermik in' " |
| **jûn** | tenduristî |
| **jûnî** | 1. çong 2. hestiyê serçongê |
| **jûr** | ode |

# K

| | |
|---|---|
| **k/K** | tîpa çardehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê ezmandevî û qirikî ye, awayê belavbûna wê girtî û hişk e |
| **ka [I]** | 1. cînavka pirsiyariyê ya ku tê wateya:li ku ye? 2.de nîşanî min bide *"dibêjin: 'hêştirê çima stûyê te xwar e? dibêje:'ka çiyê min li kar e!' " |
| **ka [II]** | alifa sewalan a ku ji giya û qeselên bi cercereyê pişirandî çêdibe*"ava di bin kayê, deng jê nayê" |
| **-ka teslîmî bê kirin** | emanet radestî xayînekî kirin |
| **kab** | kap, gûzek |
| **kabok** | hestiyê serçongê |
| **kabox** | erdê biadan ê ku avê baş hildiçine xwe |
| **kabra** | mêr |
| **kaç** | her hebeke şêkir |
| **kaçanî** | amanên ku xwarinan vala dikinê |
| **kaçik** | kefçik/kevçî |
| **kaçlok** | qûşxaneya biçûk a bi çembil û devik |
| **kaço** | teralê bêkêr |
| **kad [I]** | merc, reqabet |
| **kad [II]** | 1. gilûmût, girover2. çembera ku ser û binê wê hinekî tepisiye hundir; kûre |
| **-kada esmên** | valahiya ezmên û hemû tiştên tê de |
| **kade** | cureyekî nanê ku bi rûn û şêkir tê pehtin |
| **kadiz [I]** | kesê ku diziya kayê dike |
| **Kadiz [II]** | stêra ku di şevên sayî û şevereş de li esmên weke riyeke spî xuya dike; Kakêşan |
| **kadîn** | cihê ku ka lê tê berhevkirin |
| **kafir** | 1. kesê ku ne misilman e 2. li gorî her olê kesê ku ne ji ola yekî be |
| **kafiristan** | welatê kafiran |
| **-ma kafiristanî ye**? | ma ewqas bêwijdanî jî dibe? |
| **kafirtî** | olederî |

| | |
|---|---|
| **kahîn** | remilavêj ê ku qestîka pêşagehiyan dide |
| **kaho** | cureyekî çêreya ku nepijî tê xwarin û belçên wê peraş in; xes |
| **kahûr** | kêra kalanî |
| **kaj [I]** | gilok |
| **kaj [II]** | kirasê maran; têvil |
| **kaj [III]** | sergo, mezbele |
| **kajger** | 1. likij 2. hestîkoj |
| **kajûle** | cureyekî çêreyê ye |
| **kak** | kek, birayê mezin |
| **Kakêşan** | Kadiz |
| **kakil** | 1. dendik 2. gewher(gûz, bindeq û hwd) *"temûzê, kakil ket gûzê" |
| **kakût** | skêlet, kelax |
| **kakvîrik** | kuvark, karî |
| **kal [I]** | (sewze) xav |
| **kal [II]** | kesê temendirêj*"kalo memire bihar tê, pîrê memire pincar tê" |
| **kal [III]** | sorê tarî, al |
| **kalan** | cihê ku alavên qutkirinê tê de tên parastin |
| **kal bûn** | pîr bûn |
| **kalek** | kundir/gindor |
| **kalekal** | dengê domdar ê ku pez derdixe |
| **kalekal kirin** | (pez) bang dan, zimezim kirin |
| **kalemêr** | mêrê ku temenê wî ji pênciyî derbastir bûye |
| **kalepîr** | kalemêr |
| **kaler** | bûjena bazirganiyê |
| **kalik** | 1. bavê bavî an jî bavê dayikê 2. ecdad*“ewê ku kalikê xwe nas neke, Xwedayê xwe jî nas nake” |
| **kalîn/dikale/ bikale** | 1. (pez) bang dan 2. nalîn |
| **kalîtî** | temenborîtî, pîrtî |
| **kam [I]** | 1. daxwaz 2. fehlxwestina sewalan |
| **-kama... birîn** | 1. destekê çûnê 2. pelek avêtin ... |
| **kam [II]** | gêre |

| | |
|---|---|
| **-kam gerandin** | gêre kirin |
| **kam [III]** | rutûbet û kufika afnikiyê |
| **-kam girtin** | afnikî bûn |
| **kam [IV]** | esmanê dêv |
| **-kama dêv** | arîkê dêv |
| **kam [V]** | aramî û bextewarî |
| **kambax** | 1. xopan 2. kavilbûyî |
| **kambaxî** | 1. xopanî 2. wêranî |
| **kambaxtir** | 1. xopantir 2. xeratir |
| **kamil** | 1. gêran 2. gihayî |
| **kamil bûn** | 1. gêran bûn2. gihan |
| **kamilî** | 1. gêranî 2. gihayîtî |
| **kamir** | leven |
| **kamirî** | mêrga levenî |
| **kamox** | kesê ku bi xwe tirihê diguvişe û jê meyê çêdike |
| **kamran** | 1. bextewar û dilaram2. dilşa |
| **kamranî** | 1. bextewarî û dilaramî 2. dilşatî |
| **kamsojkî** | dilbijandî |
| **kamsojkî bûn** | dil bijankahûr din, dil kirkirîn |
| **kamsojkî kirin** | dil kirkirandin, çilekî kirin |
| **kamûk** | kamox |
| **kamûşkî bûn** | kamsojkî bûn |
| **kamûşkî kirin** | kamsojkî kirin |
| **kan** | 1. gencîne 2. cihê ku maden û xwê jê tê derxistin |
| **kanc** | bêar |
| **kancî** | bêarî |
| **kandew** | çêleka zayî ya ku cardin avis nebûye û hê tê dotin |
| **kanê** | ka li kuderê ye? |
| **kanik** | postê ku li ser çêv e û pê dadimile |
| **kanî** | jêderka avê *"merî, li ber kaniyê tî namîne" |

| | |
|---|---|
| **kanîn/dikane /bikane** | karîn |
| **kanûn** | 1. meha berfanbarê2. kûreya êgir |
| **kanza** | maden |
| **kanzanasî** | zanistên ku pisporiya wan maden in |
| **kap** | 1. hestiyê çîpê 2. bendê stûyê sewalan*"dewar bi kapan, mirov bi sozan tên girêdan" |
| **-kap avêtin** | 1. bi hev re bi hestiyê çîpê lîstin 2. ketin hevrikiyê |
| **-kap kirin** | (sewal) bi bendekî an jî bi zincîrekî girêdan |
| **kapan** | tengerê, iverê |
| **kapik** | bendê kurt |
| **kapok** | tasa sêrî |
| **kapol [I]** | tasa sêrî; kapok |
| **kapol [II]** | kaya pir hûrik |
| **kapox** | paleyê ku gurzên gihê çaw dike |
| **kar [I]** | 1. xebat, îş, şixul 2. qezenc 3. mijûlî *"berxê nêr ji bo kêr (karî)" |
| **-kar û bar** | 1. xebat û şixul2. xizmet û mijûlî*"siwarbûna kerê, ne tu kar û bar e" |
| **-karê li ser lingan** | xebata sivik |
| **kar [II]** | têjika bizinê, karik*"kar, sermedî di bin selikê de namîne" |
| **kara** | 1. fail, kirar, kirde2. endamê dilsoz ê artêşa bêpergal |
| **-karayên azadiyê** | endamên dilsoz ên artêşa bêpergal a rizgariyê |
| **karatî** | artêşa bêpergal a ku ji endamên dilsoz pêk tê |
| **karak** | madenê hêsin |
| **karbeşî** | parvekirina xebatekî |
| **karbidest** | 1. peywirdar2. karsaz |
| **karbûran** | ardû |
| **karciv** | şirket |
| **karçîn** | hirmê |
| **kardank** | malzarok |
| **karekar** | dengê segê ku hatiye lêdan; kûstekûst |
| **karekew** | nêçîra kewan a bi komekî |

| | |
|---|---|
| **karesat** | bobelat, felaket |
| **karêc** | şeneyeke ku tiliyên wê pir in; melêb |
| **karêj** | movika ku erzênê digihîne kapolê/kapokê |
| **karêl** | qebrax |
| **karêltî** | qebraxî |
| **karêz [I]** | 1. kanî 2. cihoka binerdî |
| **karêz [II]** | cihê hênik; zozan |
| **kargeh** | cihê xebatê |
| **karger** | rêvebir |
| **kargerî** | 1. rêvebirî 2. îdare |
| **kar gerandin** | 1. bi rê ve birin 2. îdare kirin |
| **karguzar** | kargerê pispor û jêhatî |
| **karguzarî** | şarezatiya gerandina karan |
| **karik** | têjika bizinê; kidik |
| **karistan** | kargeha rêzehilberindana bûjenan |
| **karîger** | 1. bibandor, bitesîr2. rêvebir |
| **karîgerî** | 1. bandor, tesîr2. rêvebirî |
| **karîn/dikare /bikare** | 1. şiyan 2. pêk anîn 3. bi dest ve anîn *"nikare, bê par e" |
| **-(pê) karîn** | 1. sernixûn kirin 2. hêz jê birin |
| **karîte** | garîte *"karîte, li ser dîwaran radiwestin" |
| **karker** | 1. xebatkar 2. pale |
| **karkenar** | karnişîn |
| **karkerî** | 1. îşkarî 2. paletî |
| **karkêş** | 1. jîr 2. jêhatî 3. zîrek |
| **kar kirin** | 1. xebitîn 2. qezenc kirin |
| **karmax** | bêjinga ku gir lê dike; serad |
| **karmend** | 1. memûr 2. wezîfedar |
| **karnişîn** | kesê ku piştî çendîn salên xizmetê ji karî tê veqetandin û mehmizek lê tê girêdan |
| **karnişîn bûn** | salên xizmetê qedandin û mehmiza karnişîniyê wergirtin |
| **karniyar** | di dezgeh û karcivan de pisporê wizeya mirovîn ê ku karkeran hildigire karî |

| | |
|---|---|
| **karniyarî** | pisporiya wizeya mirovîn |
| **karpêk** | berhem |
| **karsaz** | 1. kesê ku karkeran dide xebatê 2. kesê ku jêhatî ye û karan pêk tîne |
| **kart** | 25 quriş |
| **-kartek nedan yekî** | qet tu dirav nedan kesî |
| **kartî** | xwarina kevn |
| **kartî bûn** | (xwarin) kevn bûn |
| **kartî kirin** | (xwarin) kevn kirin |
| **kartîk** | xarê ku xerat bi kar tînin |
| **kartol** | cureyekî sewzeyên bînerdî ye û pijandî tê xwarin |
| **kartû** | kartî |
| **karwan** | 1. koma bazirganên gerok 2. komeke rêwiyan *"bi ewtîniya çend kûçikan, ji rê namîne karwan" |
| **Karwankuj** | stêra ku di destpêka meha gelawêjê de tê dîtin û 5-6 mehan xuya dibe |
| **karxane** | karistan |
| **karzan** | kesê ku dizane dê çi îşî bike; şareza |
| **kas** | 1. piyan 2. kasik |
| **kase** | 1. sandiqa darînî ya ku sewzeya dikinê 2. çavî3. selika erebeyan |
| **kasik** | 1. kaseya biçûk 2. feraqa ji gil û heriyê; kaxetîtik |
| **-kasika çêv** | şûna çêv |
| **kasox** | dasa biçûk |
| **kastekast** | 1. dengê nalenala kûçik û guran 2. çeleçel |
| **kastekast kirin** | 1. (seg û gur) nalenal kirin, zûrîn2. çeleçel kirin |
| **kaş [I]** | giyayê ku bi xwe hişk bûye |
| **kaş [II]** | 1. alava ku dişimite, kaşe 2. piyên vê alavê |
| **kaş [III]** | hevrazê ku mêş tê de dijwar e, berpal |
| **kaş [IV]** | kişandin |
| **-kaşî ber piyê xwe kirin** | gazî hinda xwe kirin |
| **-kaş û berkaş kirin** | hev birin û anîn |

| | |
|---|---|
| **kaşane** | avahiyên dewlemendan ên fireh û xweşik; koçik |
| **kaşe** | navgîna ku bi şimitandina li ser berf û qeşayê tê ajotin |
| **kaşik** | qada ku mirov li ser berf û qeşaya wê werzîşa şimitandinê dike; tîl |
| **kaşing** | şala navê |
| **kaşî** | cureyekî kevirê acûrî ye û di avasaziyê de tê bikaranîn |
| **kaşxane** | koçk |
| **kaş kirin** | 1. bi erdê re kişandin2. leqandin 3. ji cihekî ber bi cihekî din ve livandin *"Xwedê mirovî şaş meke, lê şaş kir bila fehş meke û heke fehş kir jî bila bi erdê re kaş meke" |
| **kaşo** | darê gogê |
| **kat [I]** | erdê ku xêr û bera wî hindik e |
| **kat [II]** | zeman, dem, çax |
| **kat [III]** | zîlên simbilan ên pêşîn |
| **-kat dan** | zîl dan |
| **katar** | bazinê stûyî, tara stûyî |
| **kate** | cureyekî nanê ku bi rûn û şêkir tê pehtin; kade |
| **katjimêr** | alava demjimêr; saet |
| **kav** | dema berhevkirina bindeqan |
| **kavarî** | 1. xişirge 2. cihê bikevir 3. serkevir *"gava dê bibe dêmarî, bav dibe filehê kavarî" |
| **kavil** | 1. xerabe, kelefe 2. xopan, wêran |
| **kavir** | peza dusalî |
| **kaw** | 1. kubar 2. qure |
| **kaw bûn** | 1. kubar bûn 2. qure bûn |
| **kawdan** | 1. şert û merc2. qalik |
| **kawêj** | kayîna hin sewalên ku goştê wan tê xwarin |
| **-sewalên kawêjker** | ajalên ku pariyên xwe piştî çêrînê û di demên rawestanê de dicûn |
| **kawik** | kesê ku lap ne dînik e û demên wî ên biaqiliyê jî hene |
| **kawî** | 1. kubarî 2. juretî |
| **kax [I]** | vejibartina giyayên nenas ên ku di nav bîstanan de şîn dibin; aşêf |
| **-kax kirin** | aşêf kirin, ade kirin |
| **kax [II]** | amanên ku ji heriya pijandî tên çêkirin, acûr |

| | |
|---|---|
| **kaxetît** | tîtik û amanên ji acûrê |
| **kaxez** | bûjena ku ji dar û pemboyî tê çêkirin û li serê tê nivîsandin |
| **kaxik** | guldanka ji kaxetîtê |
| **kaxiz** | kaxez |
| **kaxîl** | cureyekî çêreyê ye |
| **kayîn/dikaye /bikaye** | (sewala çarpê a ku goştê wê tê xwarin) parî cûtin, vekayîn |
| **kebanî** | 1. jina malê 2. jina aşpêj *"heke Xwedê li hev anî, Eyşê dikim kebanî" |
| **kebar** | 1. berbang 2. tekbîr |
| **keç [I]** | zaroka qîzînî*"keç, bi hefsar nabin" |
| **keç [II]** | xwar, nerast |
| **keçanî** | 1. rewşa mêtiya zarokê 2. mînanî zaroka qîzînî |
| **keçap** | qîzap |
| **keçel** | serût, bêpor, qafrût, zelût *"her keçel, bi pereyê xwe helawê dixwe" |
| **-keçelê qaqê** | kesê ku serê wî wekî hêkê bê por e |
| **keçelî** | bêporî, serûtî, qafrûtî*"keçelî xweş e, lê gava ku di bin kum de be" |
| **keçelok** | qafgurî, zelût |
| **keçêç** | cihê ku mirîşk lê dimelisin |
| **keçhêlî** | 1. keça jina mirovî ya ji mêrekî din 2. keça mêrê jinê ya ji jineke din |
| **keçik** | 1. keç 2. zaroka delalik*"keçik, teşiya dê radike, lawik jî tîra bavê" |
| **keçinî** | bekaret, duşîzetî |
| **keçî** | xwarî, nerastî |
| **keç kirin** | (çeka agirber) armanc negirtin, xwar çûn |
| **keçxapînok** | kesê ku li pey jinan digere û wan dixapîne, mêbaz |
| **ked** | 1. berhemê renca mirovî2. maf *"li kuderê komek, wê derê kedek" |
| **kedanî** | sewalên bibask ên malê |
| **keder** | kul û xem |
| **kedew** | ketew |
| **kedewî** | ajalê ku bi çilmasa ajalan ketiye |
| **kedik** | eyarê berx û karan |
| **kedî** | sewala malê |
| **kedî bûn** | hînî malê bûn*”gur kedî nabe, kedî bibe jî xwedî nabe, bêar bifedî nabe” |

| | |
|---|---|
| **kedî kirin** | hînî malê kirin |
| **kedkar** | 1. xwediyê mafê xwe 2. xwediyê karê xwe |
| **kedxur** | kesê ku mafê xebata yekî bi neheqî dixwe |
| **kedûn** | kûzê avê yî biçûk; quto |
| **kef [I]** | hundirê dêst |
| **kef [II]** | zîpik û peqpeqokên ku li ser tiştên avî dikevin *"kela hêrsê, kefa sabûnê ye" |
| **-kef dan** | zîpikên nepoxkî û peqpeqok li serê xuya bûn |
| **kefandin/dikefîne/bikefîne** | 1. kêl kirin 2. dirûtin |
| **kefaret** | berdêla ku ber nekirina karekî ve tê dayîn |
| **-kefareta gunehan be** | bila bibe sedeqeya ber gunehan ve |
| **kefen** | qumaşê bêdirûn ê ku li miriyan tê pêçan û paşê tên çalkirin |
| **-kefen kirin devê xwe** | bê minet û bi wêrekî ajotin ser mirinê |
| **kefgir** | amana ku kefa ser tiştê avî hildide |
| **kefî** | 1. pûşiyeke ku di zivistanan de li stûyî tê alandin2. egal |
| **kefîl** | derhûd |
| **-bûn kefîlê yekî** | berpirsiyariya karê kesekî hildan ser xwe |
| **kefîltî** | derhûdî |
| **kef kirin** | zîpik û peqpeqok li serê xistin |
| **keftar** | 1. cureyekî sewalên çolê ye û dişibihe guran2. kal |
| **keft û left** | 1. bizaveke mezin a ji bo peydekirina pariyê jiyanê; têkoşîn2. devjenî |
| **kefxoy** | keyayê gund û taxên filehan |
| **kehreb** | 1. gêreba, cêreyan2. miqnatis |
| **kehrebar** | 1. gêrebayî, cêreyanî2. miqnatisî |
| **kej** | çûr, zerînî |
| **kejal** | keça çûr a zerînî |
| **kejave** | çardara ku pê birîndar û nexweşan neqlî nexweşxaneyan dikin |
| **kejê** | keça çûr a delalik |
| **kejok** | nexweşiya hêtêşê |

| | |
|---|---|
| **kek** | birayê mezin |
| **kel [I]** | dewara dusalî |
| **kel [II]** | 1. germ, tîn 2. rik, hêrs *"kela hêrsê, kefa sabûnê ye" |
| **kel [III]** | sewala biqiloç |
| **kelabçe** | destvank, kelemçe |
| **kelabe** | darik an jî dirankên hilawestina kincan; hilço |
| **Kelamê Qedîm** | 1. Quran2. wehy |
| **kelandin/dikelîne/dikelîne[I]** | 1. germ kirin2. pijandin, pehtin |
| **kelandin/dikelîne/dikelîne[II]** | 1. xwirandin2. gurî bûn |
| **kelaş [I]** | cureyekî solên berê ye; çarix |
| **kelaş [II]** | term, laş |
| **kelat** | cihê asê |
| **-kelat û felat ji hev nas nekirin** | cihê zorî serfiraziyê ji hev veneqetandin |
| **kelbetan** | alava ku agir pê tê hildan |
| **keleba** | keleşêr |
| **keledoş** | cureyekî xwarinê ye û li her herêmê bi awayekî tê çêkirin |
| **kelef** | telaşê rîs |
| **kelefe** | bermaya tiştê kavilbûyî; enqaz |
| **kelegirî** | ber girînê, hema hema dike ku bigirî |
| **kelegirî bûn** | ber asta girînê bûn |
| **kelegirî kirin** | anîn ber asta girînê |
| **keleh** | parêzgehên leşkerî yên berê; duz *"jin keleh e, mêr jî tê de girtî ye" |
| **kelejin** | jina ku mêranî tev digere |
| **kelek** | navgîna ku di çem û rûbaran de lê siwar dibin*"divê mirov keleka xwe di avê re derbas bike" |
| **kelekel** | germa havînê ya tîr |
| **kelekor** | 1. kêmlebat 2. nefehma û xêvik |

| | |
|---|---|
| **kelem [I]** | cureyekî sewzeyan e, pijandî û nepijî tê xwarin |
| **kelem [II]** | 1. pîj 2. berbend*“cîranê nebaş, kelemê ber çavan e” |
| **-kelemê ber çavê neyaran** | lehengê ku dijmin jê dibehicin |
| **kelemêr** | egîd |
| **kelenimêj** | kesê ku carinan nimêj dike û pirî caran jî nake |
| **kelepîçe kirin** | (sewalê serjêkirî) gurandin û parçeparçeyî kirin |
| **kelepor** | 1. mîrate 2. heyiya gelekî |
| **-kelepora neteweyî** | mîrateya gelekî ya ku ji nifşên berê derbasî nifşên nû dibe |
| **kelerim** | cureyekî sewzeyên ku pijandî tê xwarin |
| **kelestûn** | keskesor keleş 1. delal, cazibedar2. mêrxas |
| **-keleşê deryayî** | kesê ku derî zagonên heyî di deryayan de talana keştiyan dike |
| **keleşêr** | keleba, dîk |
| **kelexwarî** | xelexwarî |
| **kelexwarî bûn** | xelexwarî bûn |
| **kelezûrî** | 1. xurekê ku baş nepijiyaye 2. karê ku ne bi rêk û pêk e *"girara piran, kelezûrî ye" |
| **kelê** | xwarina bêxwê an jî kêmxwê |
| **kelh** | 1. rind 2. bi îhtişameke nedîtî û nebînayî |
| **kel hatin** | germ bûn |
| **kelhoşk** | bihura çiyayî |
| **kelijandin/di kelijîne/ bikelijîne** | bi hev ve lehîm kirin |
| **kelijîn/dikelij e/bikelije** | bi hev ve zeliqîn |
| **kelistin/dikel ize/bikelize** | 1. dizîka payîn 2. teletel temaşe kirin 3. li hember tiştekî ecibandî mit man |
| **kelixîn/dikeli xe/bikelixe** | pîr û diranketî bûn kelî kelê |
| **kelîn/dikele/ bikele** | 1. germ bûn 2. pijîn *"serên du beranan, di beroşekê de nakelin" |

| | |
|---|---|
| **kelîşo** | 1. cilşo 2. karê cilşûştinê |
| **kelk** | 1. fayde 2. meslehet |
| **-kelk jê wergirtin** | sûd jê wergirtin |
| **kelkot** | 1. kelik û palaz 2. xelexwarî |
| **kelkût bûn** | kutan xwarin |
| **kelkût kirin** | ser û guh di rû de anîn, gelekî lê dan |
| **kelmêş** | pêşû |
| **kelogirî** | kelegirî |
| **kelojtin/dikeloje/bikeloje** | dendik şikandin û kakil jê derxistin |
| **kelojk** | 1. kakila ku ji dendika şikandî hatiye derxistin2. rişwet |
| **-li kelojkan gerîn** | li qezencên herwe û bêzehmet gerîn |
| **kelpezî** | 1. cureyekî margîseyên ku li gorî her deverê rengê xwe diguherîne; kerpeze 2. durû |
| **keltox** | kalemêrê hizhizî û hopohopo |
| **kelû [I]** | çivange |
| **kelû [II]** | her meheke falnameyê; birc |
| **kelwaz** | sermaya xurt |
| **kelxaçî** | kelezûrî |
| **kelx** | keltox |
| **kelxot** | diranketî |
| **kem** | guhên biçûk an jî tuneyî; kur |
| **kember** | qûşa navê |
| **kemç** | careke lêxistina şêr û hirçan |
| **kemç bûn** | tûşî tundiyekê hatin û nîvî jê qut bûn |
| **kemçe** | amraza ku erdê dikole |
| **kemç kirin** | bi tundî lê xistin û jê beşek qut kirin |
| **kemend** | bendê ku hilboqek bi serê wî ve ye |
| **kemişîn/dikemişe/bikemişe** | 1. vepelîn ber2. xwe quraftin ser û daqurtand |

| | |
|---|---|
| **kemitandin/ dikemitîne/bikemitîne** | 1. (da ku pirç zû jê daweşe) di ava keliyayî de rawestandin2. qefilandin |
| **kemitîn/dikemite/bikemite** | 1. (da ku pirç zû jê daweşe) di ava keliyayî de rawestîn 2. qefilîn |
| **kemîn** | tele, dafik |
| **-kemîn danîn** | tele danîn, dafik danîn |
| **kemlan û giran** | weqûr û awirşikestî |
| **kemole** | satila devgirtî ya pir mezin |
| **kemxe** | qumaşê hevrîşimî |
| **ken** | 1. besimîn, bişirîn2. geşî *"kenê bêaran, tê ji qulên dîwaran" |
| **kenandin/dikenîne/bikenîne** | 1. besimandin2. rûgeş kirin 3. dilxweş kirin |
| **kenar** | kêlek |
| **kenarî** | cureyekî çivîkan e |
| **kend** | çal, xendeq, kortal |
| **-kend û kosp** | çal û astengî |
| **kendal** | newala kûr; hendef |
| **kendav** | xelîc, avteng |
| **kendik** | 1. golika hilikî 2. golika ku nebûye moz |
| **kenefe** | avahiyê kewişî |
| **kengî/kengê** | çi wextî, çi çaxî *"kengî bibare, hingî zivistan e" |
| **kenhar** | kesê kenandî |
| **kenişt** | dêra filehan |
| **keniz** | berdestiya jin |
| **kenîn/dikene/bikene** | 1. besimîn, bişirîn 2. rûgeş bûn 3. hîrehîr kirin*"bi hevalê xwe mekene, dê bê serê te jî" |
| **kenîşte** | perestgeha cihûyan |
| **kenkene** | zengîn û hêzdar |
| **kenloşkî kirin** | bi dizîka qûnektî kirin |
| **kenok** | rûgeş |

| | |
|---|---|
| **kenokî** | 1. rûgeşî 2. kenok*"ne jina kenokî, ne mêrê fêtokî" |
| **kenze** | fayke |
| **kepaze** | rezîl û riswa |
| **kepaze bûn** | rezîl û riswa bûn |
| **kepaze kirin** | rezîl û riswa kirin |
| **kepen** | kulavê şivanan |
| **kepenek [I]** | cureyekî çêreyê ye |
| **kepenek [II]** | cureyekî nexweşiya pişikreşê ye |
| **kepenekî** | kesê ku bi nexweşiya pişikreşê ketiye |
| **kepez** | 1. dibûr, berpal 2. kêrtê bilind |
| **kepir** | çartaq, holik |
| **kepîr [I]** | tiştê windabûyî |
| **kepîr [II]** | çêreyek e |
| **kepîr [III]** | ji ber camaxê zerbûna diranan |
| **-kepîr girtin** | (diran) camaxî bûn |
| **kepû** | bevil, poz |
| **kepûr** | xweliya giran |
| **ker [I]** | 1. cureyekî ajalên barkêş ê ku ji hespê biçûktir e 2. ehmeq *"bar naçe ber kerê, ker diçe ber bêr" |
| **ker [II]** | kesê ku nabihîze |
| **-ker û lal bûn** | bêdeng guhdarî kirin, dengê xwe nekirin |
| **ker [III]** | parçe, hinek |
| **kerafî/keratî** | 1. tirtûl, ziqûm 2. merez |
| **keramet** | îkrama ku Xwedê li hin bendeyên xwe kiriye |
| **kerane [I]** | wekî keran |
| **kerane [I]** | mîrkutê hesinî |
| **kerate** | alava ku sol pê asantir dikevine piyan |
| **keravî** | cureyekî sewalên ku li cemseran dijîn |
| **kerax** | paleyê sewzeyan |
| **keraxe** | garana keran |
| **keraxî** | paletiya sewzeyan |
| **kerb** | 1. kul û xem 2. bêrî*“ez namirim bi vê derbê, ez dê bimirim bi vê kerbê” |

| | |
|---|---|
| **-kerba xwe ji yekî derxistin** | hêrsa xwe bi tiştekî din ve aşt kirin |
| **ker bûn [I]** | nebihîstin |
| **ker bûn [II]** | parçe bûn |
| **kerbeş** | cureyekî striyan e, pîjên keran *"qedrê gulê çi dizane, kerbeş dibêje: 'kerê reş' " |
| **kerçove** | 1. aqilsivik, kêmaqil2. peledîn, tiredîn3. kerose |
| **kerdenek** | hestîvk |
| **kerdî** | 1. çala ku li der û dora daran vedidin da ku av tê de bisekine 2. li gorî cureyan beşên bîstanan |
| **-kerdiyeke bîstanî avêtin** | di çalekê de cureyekî sewzeyan çandin |
| **kerehû** | cureyekî bê ye |
| **kereker [I]** | mînanî keran bêteşe |
| **kereker [II]** | bi dizîka û bêdeng |
| **kerem** | 1. destbelaşî 2. comerdî |
| **-ji kerema xwe** | heke zehmet nebe |
| **kerem kirin** | 1. bexşek li yekî kirin 2. îkrama yekî qebûl kirin |
| **-kerem ke** | fermo |
| **kereng** | cureyekî çêreyê ye û nepijî tê xwarin*"gotin: 'kerengo warê te li ku ye? got: 'ba dizane'" |
| **kereste [I]** | onî, dep |
| **kereste [II]** | 1. malzeme, naverok 2. bûjen |
| **-keresteyê xav** | bûjenên ku nehatine bikaranîn û jê hilberînên curecureyî tên çêkirin |
| **kerexne** | kelbetanê ku pê kûziyên êgir tên hildan |
| **kerg** | destgeh |
| **kergez** | cureyekî teyrên berateyan e |
| **kergît** | alaveke tevn-raçandinê ye; hepik |
| **kerguh** | kîvroşk, kêvrîşk |
| **keribîn/dikeribe/bikeribe** | 1. behicîn 2. kesirîn |

| | |
|---|---|
| **keriftin/dikerife/bikerife** | ziqûm xwarin, kureder xwarin, kul xwarin |
| **kerik [I]** | mêweyên negihiştî, behîvk |
| **kerik [II]** | di guh de kuna ku di navbera guh û perdeya wî de ye |
| **-di kerika guh de qîrîn** | (di dema bangkirinê de) devê xwe dirêjî qulika guhî kirin û wisa peyivîn |
| **kerik [III]** | kerê biçûk |
| **kerixandin/dikerixîne/ bikerixîne** | 1. jê vegerandin2. jê dan nefretkirin3. jê bêzar kirin |
| **kerixîn/dikerixe/bikerixe** | 1. jê vegerîn 2. jê nefret kirin 3. tengezar bûn |
| **kerî [I]** | simbilên bipûrt ên bi serê cîl û cegên ve |
| **kerî [II]** | xilek pez ê ji 100 hebî heta 200'î *"heft |
| **kerî** | pez, li bin siya darekê mexel tên" |
| **kerî [III]** | 1. parçe 2. bir3. tîke *"nanê ku bibe kerî, hev nagire" |
| **-kerî kirin** | 1. parçe kirin2. tîketîkeyî kirin 3. birbirî kirin |
| **kerî [IV]** | rewşa nebihîstina guhan |
| **-xwe li keriyê danîn** | xwe nebelediyê û nebihîstinê danîn |
| **ker kirin [I]** | tîke kirin |
| **ker kirin [II]** | dengê xwe nekirin |
| **kerkedan** | sewaleke kovî ya girs e û bi serê difnê wî ve qiloçek heye |
| **kerkere** | 1. nezan 2. têne gihiştî3. kerose |
| **kerkovî** | cureyekî sewalên kovî yên ku dişibihine keran û rengê wan ji xêzên reş û spî pêk tê |
| **kerme** | rêxa hişkirî ya ji bo şewatê |
| **kermêş** | cureyekî mêşên girs e û pêvedana wê bi şewat e; moza keran |
| **kerose** | ehmeq, kerkere |
| **kerpeze** | kelpezî |
| **kerpîç/kerpûç** | heriya ku di qalibên çargoşe de tê rokirin û di lêkirina dîwaran de li şûna keviran tê bikaranîn |
| **kerseng** | 1. komikên xweliyê ên wekî keviran dixuyin lê zû belav dibin 2. xwîn û tiştên avî yên din ên ku bûne pixtî |

| | |
|---|---|
| **kersil** | silepor |
| **kertek** | pir, zehf |
| **kertik** | kewre |
| **kerx** | 1. westiyayî 2. bêhêz3. jihêzketî |
| **kerxane** | 1. goma keran2. xaneya zinayê; qehbikxane |
| **kerxerê** | şiverê |
| **kerxur** | 1. cureyekî teyrên berateyan e 2. mirovê pir xurekxur |
| **kes** | 1. mirovê nediyar, şexs 2. ferd *"filan kes, kerê barkêşiyê ye" |
| **kesadî** | 1. kêmasî 2. xela |
| **kesandin/dikesîne/bikesîne** | (r) kesayetî li cînavkê bar kirin |
| **kesane** | ferdî |
| **kesaxtin/dikesixîne/bikesixîne** | 1. rûçikandin2. çiqil kirin 3. verûtin |
| **kesayetî** | şexsiyet |
| **kesb** | 1. ked 2. qezenca ji xebatekê |
| **kesber** | keskê sût |
| **kesberî** | sûtî |
| **kesbik** | moriya nezerê |
| **keser** | 1. keder, xem 2. êş, derd 3. bêrî |
| **-keser kişandin** | 1. êşîn2. hezinîn, derdomerdo bûn 3. bêrî kirin |
| **kesirandin/dikesirîne/ bikesirîne** | 1. êşandin2. derd lê rakirin 3. westandin û pir tî kirin |
| **kesirîn/dikesire/bikesire** | 1. xemgîn bûn 2. derdoyî bûn 3. tî bûn |
| **kesixîn/dikesixe/bikesixe** | 1. qeşirîn, herişîn2. rûçikîn |
| **kesîb** | xizan |
| **kesk** | rengê çêreya ter a neçilmisî |
| **keskahî** | 1. sewzî, hêşinahî2. nesl |

| | |
|---|---|
| **-Keskahiya Pêxember** | Ehlubeyta Cn. Pêxember eleyhiselam |
| **keskesor** | (piştî taviyên baranê) nîvçembera rengîn a ku li esmên xuya dibe; heftreng, kevana Dawid |
| **-bi ser keskesorê re qefz kirin** | derî aqilan tev gerîn |
| **keslan** | teral, lexer |
| **kestek** | kerpîç |
| **keş** | fîşenga ku di valahiyê de tê teqandin û nagihêje nîşanê |
| **keşîş** | popê filehan *"keşîş, hero kadeyan naxwe" |
| **keşîşxane** | dibistana ku keşîşan perwerde dike |
| **keşk** | cureyekî şorbeyê ye |
| **keşklok** | 1. kade 2. nanê hişk-kirî |
| **keşkul** | şeleke kermeyî keştî navgîneke zeryayî ya rêwîtî û barkêşiyê ye |
| **-keştiya asimanî** | cureyekî navgînên firoke yên ku ji cîhanê rêwiyan dibin ser hîvê an jî gerestêrkên din |
| **-keştiya perdedar** | cureyekî navgînên raguhastinê yên ku bi alîkariya perdeyên berbiba di avê de diçin |
| **keştîvan** | ajovan û xebatkarên keştiyê; deryavan |
| **ketew** | çilmasa ajalan |
| **ketin/dikeve /bikeve [I]** | 1. wergerîn 2. hilweşîn3. bihurîn 4. daketin*"ker ker e, nakeve nav ava kûr" |
| **ketin/dikeve /bikeve [II]** | (sewalên wekî seg û guran) velezîn, veketin |
| **-lê ketin** | 1. îsabet kirin2. tê gerîn |
| **-ketin keleha qatil-batilê** | 1. xwîna xwe kirin stûyê xelqê 2. ji gotina xwe danegerîn |
| **-ketin kirasan** | (jin) heyz bûn, ketin kincan |
| **-ketin zikê diya xwe** | pêrgî aramiyeke bêpayan hatin |
| **ketî** | 1. keftî, bêkes 2. bêxwedî*"ketî, bi xebatê radibin" |
| **ketxweda** | kesê ku di qesrên maldaran de hesabê xerc û mesrefê digire |
| **keval** | weneyê bi dest çêkirî û çarçivekirî |

| | |
|---|---|
| **kevalber** | kevirên ku berê li şûna kaxezê li serê dihate nivîsandin |
| **kevan** | 1. alava tîravêtinê, qews 2. xwar 3. tewiyayî |
| **kevan bûn** | 1. xwar bûn2. tewîn |
| **kevane** | çivange |
| **kevanek** | (r) di xalbendiyê de nîşaneya ku dişibihe heyvikê, () |
| **kevanjene** | 1. tîravêj 2. kesê ku dibe bela û dikeve pêsîra xelqê |
| **kevan kirin** | 1. xwar kirin2. tewandin |
| **kevçik** | 1. amana ku xurek pê tê xwarin 2. hestiyê sersîngê yî navendî*"dawet tune, li kevçikan digere" |
| **-di kevçika dil de lêxistin** | 1. (da ku neks lê biçike) di sersîngê de lê xistin 2. bi derbeke xedar lêxistin |
| **kevçî** | kevçik |
| **kevel** | 1. postê pêz û hwd; eyar 2. lewhe |
| **kevel kirin** | post kirin, gurandin |
| **kever [I]** | çiyayê ji kevir û zinaran pêkhatî |
| **kever [II]** | bizina belekbelekî/ deqdeqî |
| **kevil** | postê mihan |
| **kevir** | 1. ber 2. zinar 3. lat*"kevir, bi kêvir dibe dîwar" |
| **-kevirê kehrebar** | cureyekî kevirên miqnatisî ye û jê mûriyên gerdenî û tizbiyan tên çêkirin |
| **-kevir bi ser yekî de gêr kirin** | lome û gazinc lê kirin |
| **-kevir kirin** | 1. rê bi keviran çêkirin 2. bi keviran bera yekî dan, ricim kirin |
| **-kevir li ser kêvir neman** | tu tişt di dêst de neman |
| **-kevir li ser kêvir nehiştin** | 1. her tişt rûxandin û tepeser kirin 2. qir û pir kirin |
| **kevirheste** | cureyekî kevirên ku di ber beraşê hesteyan de tê bicihkirin û bi zivirandinê çîk vedide |
| **kevî** | 1. kêlekên çem û zeryayê2. tixûb, sînor, sîtar |
| **kevîşen** | qeraxa zeryayê ya tenîsk a ku melevanî tê de ne dijwar e |
| **kevkanî** | berdeqanî |

| | |
|---|---|
| **kevjal** | cureyekî heşeratên jehrîn e |
| **-kevjalê zeryayî** | cureyekî sewalên behrê ye û tê xwarin |
| **kevlan** | tûrik û derdana ku tîran dikinê; tîrdank |
| **kevloşk** | qerçûmek |
| **kevkîkî tê werkirin** | tiştek ber bi tiştekî din ve avêtin; virvirkî avêtin |
| **kevn** | 1. neteze 2. qedîm3. jibîrbûyî 4. peritî 5. rizyayî *"axa, tep davêjin serê û defterên kevn vedikin" |
| **kevnare** | 1. heyber û bûjenên dîrokî 2. têkildarî berê |
| **kevnebizot** | agirê ku ji zû de hatiye pêxistin *"agir di kevnebizotan de dimîne" |
| **kevnedost** | hogirê ji mêj ve û razdarê berê |
| **kevnekotik** | 1. têkberên kevn û peritî 2. cil û palazên riziyayî |
| **kevnemayî** | 1. heyberên dîrokî yên ku hîna li piyan e an jî tên naskirin2. agehiyên dîrokî yên ku hîna jî di nava çanda jîndar de ne |
| **kevneperest** | 1. paşverû2. muhafezekar |
| **kevneşop** | dab û nerît, adet û urf |
| **kevneşopî** | gelêrî |
| **kevok** | cureyekî çivîkan e û berê ji bo şandina nameyan dihatine bikaranîn |
| **kevot [I]** | cureyekî çivîkan e û dişibihe kevokan |
| **kevot [II]** | dareke bêber e û jê amanên curecureyî tên çêkirin |
| **kevz** | çêreyeke ku li qeraxên çem û zeryayan hêşîn dibe |
| **kevzî** | sewz, kesk |
| **kew** | kevok |
| **-kewa pehtî** | nêçira ku bêzehmet bi dest dikeve |
| **kewal** | sewal, terş (pez û bizin) |
| **kewandin/di kewîne/bike wîne** | 1. dax kirin 2. biraştin 3. (di kirîn û firotanê de) xapandin 4. (derman) birîn pak kirin |
| **kewanî** | jina malê, kebanî*"kewanî bûn sisê, kodik çûn ber sê" |
| **kewar [I]** | 1. embar 2. çala zêd a di hundir de*"çi bixî kewarê, ew tê xwarê" |
| **kewar [II]** | cihê ku mêşa hingiv lê hingiv datîne |
| **kewaşe [I]** | rûxiyayî |

| | |
|---|---|
| **kewaşe [II]** | pûş û pelaş |
| **-kewaşe kirin** | (serê banekî) bi pûş û pelaşî serê banî ava kirin |
| **kewçêr** | meha dehemîn a salnameya zayînî |
| **kewden** | 1. ehmeq 2. gêj |
| **kewderî** | dîkê çolê |
| **kewgir** | nêçîrvanê kewan |
| **kewişîn/dikewişe/bikewişe** | (avahî) rûxîn û hilweşîn |
| **kewîn/dikewe/bikewe** | 1. dax bûn 2. birijîn 3. (birîn) pak bûn |
| **kewre** | hesinê girtikgirtikî yê ku alavên qutkirinê pê tên tûjkirin; kertik |
| **kewre kirin** | tûj kirin |
| **kewşen [I]** | hevrazê ku tav lê naxe |
| **kewşen [II]** | çêreyek e |
| **kewtekewt** | dengê domdar ê reyîna segan |
| **kewtîn/dikewte/bikewte** | 1. (seg) reyîn, ewtîn2. (mirov) pizepiz kirin, beletewş axaftin |
| **kewtkewto** | çelçelok |
| **key** | mîr, şah *"axa, bi deh gundên xwe ve wisa bawer dike ku Xosrewê Key e" |
| **keya** | rêvebire gundekî/ taxekî; muxtar *"li dû zivistanekê du bihar, di gundekî de du keya nabin" |
| **keyanî** | muxtartî |
| **keyitî** | mîrîtî, şahitî |
| **keybanû** | mîrxê, mîrxanim |
| **keyperest** | pêgirtî û hevalbendê pergala keyitiyê; şahperest |
| **-keys xweş qefaltin** | riya revê jê standin |
| **keys kirin** | 1. tertîb kirin2. têkûz kirin |
| **keyskirî** | 1. bitertîb 2. têkûz û bipergal |
| **keyso/keysperest** | 1. firsendger 2. berjewendîperest |
| **Keywan** | gerestêrkek e |

| | |
|---|---|
| **kezaxtin/dikezêxe/bikezêxe** | kesaxtin |
| **kezeb** | 1. ciger 2. zarokên mirovî *"arê kezebê, ji arê tenûrê germtir e" |
| **kezixandin/dikezixîne/ bikezixîne** | kesaxtin |
| **kezî [I]** | guliyên por |
| **kezî [II]** | edaleyên cendêk |
| **kezî [III]** | 1. xama 2. keça bermêr *"filan keso tu dibêjî qey qîza kezî ye" |
| **kezîn** | çavî |
| **kezîkur** | jina ku porê xwe qaçî kiriye û porê wê êdî nayê hûnan |
| **kezîzer** | jina gulîzer |
| **kezwan** | cureyekî daran e û jê benîşt tê bidestxistin*"çêlik û dotin, kezwan û kelandin li hev nayên" |
| **kê** | 1. çi kes, kî 2. pirsa ku bersîva wê kirde ye *"gava Xwedê ji yekî re li hev tîne, nabêje: 'tu kurê kê yî?' " |
| **kêç** | cureyekî bihokên biçûk e, di qirejiyê de û bi xwînê dijî |
| **kêf** | zewq û sefa |
| **-kêf jê re hatin** | 1. zewq jê wergirtin 2. tahmijîn3. hez kirin |
| **kêfşing** | kevjal |
| **kêfxweş** | 1. kesê ku temtêla wî baş e 2. kesê ku ji tiştekî razî ye 3. şa û şanaz |
| **kêfxweş bûn** | 1. jê razî bûn 2. şa bûn 3. halxweş bûn |
| **kêfxweş kirin** | 1. jê razî kirin 2. şa kirin 3. halxweş kirin |
| **kêfxweşî** | 1. razîtî 2. şadî 3. halxweşî |
| **kêl [I]** | dirûnên girs, şêl |
| **-kêl kirin** | bi dirûnên girs dirûtin, şêl kirin |
| **-kêlkêlî kirin** | şêlşêlî kirin, bi dirûneke demdemî dirûtin |
| **kêl [II]** | kevirên ku mezelên miriyan pê tên nasîn |
| **kêl [III]** | gav, kat |
| **kêlan/dikêle /bikêle [I]** | erd kolan |

| | |
|---|---|
| **kêlan/dikêle /bikêle [II]** | zevî cot kirin |
| **kêlangeh** | erdê ku ji cotkirinê re hatiye veqetandin |
| **kêlek** | 1. hind, tehêl, 2. hêl, alî *"kêleka xwe ya birêx, li rêhevalan mede" |
| **-kêleka xwe dan kêleka bokeberanan** | tevî mêrxasan rabûn û rûniştin |
| **kêlik [I]** | demeke pir hindik; xulek |
| **kêlik [II]** | kevirê serê mezelê miriyan; kêl |
| **kêlindî** | alava çandiniyê ya ku pê giya û zad tê çinîn |
| **kêlî** | 1. bîsk, xulek 2. karê ku ewqas ne pêwist e û di asta duyemîn de tê3. bone 4. dirûna girs, şêl |
| **kêlûk** | jina nemisilman an jî ji neteweyeke din |
| **kêlûn** | kilîla mezin a darînî an jî hesinî ya ku ku pê dergehên mezin tên dadan |
| **kêm [I]** | ava birîn û pizrikê; cerahat |
| **-kêm û amas** | cerahat û îltihab |
| **kêm [II]** | 1. hindik 2. biçêx3. nekemilî *"aqilê |
| **kêm** | , riya xwar ber bi hevalê xwe dixe" |
| **-kêm û zêde** | 1. hindik û pir 2. virde û wêde 3. di vê navberê de |
| **kêmanî** | 1. kêmasî 2. xeletî3. qusûr *"kêmaniya kesekî, ji kesekî din re nabe bar" |
| **kêmar** | 1. hejmara hindik2. neteweya ku di nav neteweye ke din de hejmara wan ne zêde ye |
| **kêmasî** | 1. karê ku li gorî pêdiviyê nehatiye qedandin2. qusûr û nivîşkanî*"her xweşikek, kêmasiyeke wê heye" |
| **kêmber** | endazeya ku ne fireh e; berteng |
| **kêm bûn** | 1. nekemilîn 2. hindik bûn 3. daketin*"gotin: 'kero, dehşikek ji te re çêbû'; got : 'alifê min kêm bû û barê min jî zêde bû' " |
| **kêmek** | di hesabdariyê de nîşaneya ji hejmarekê daxistina yeke dîtir, (-) |
| **kêmendam** | kesê ku endamekî wî nivîşkan e |
| **kêmendazî** | tevgerîna ne li gorî pêwistiyê |
| **kêmendazî kirin** | (peywir li gorî pêwistiyê) bi cih neanîn |
| **kêmî** | 1. hindikayî 2. biçêxî3. kêmasî |
| **kêm kirin** | 1. hindik kirin2. daxistin 3. jê birîn |

| | |
|---|---|
| **kêmlebat** | kesê nivîşkan |
| **kêmlebatî** | rewşa nivîşkaniyê; seqetî |
| **kêmnetewe** | gelê kêmar |
| **kêmxwînî** | cureyekî nexweşiyên ku têkildarî xwînê ye |
| **kêr [I]** | fêde, sûd |
| **kêr [II]** | alava qutkirinê*"kêr, kalanê xwe nabire" |
| **kêrakî** | roja yekşemê |
| **kêran** | darê stûr ê ku davêjin ser banekî fireh û ên biçûk jî li ser wî datînin; garîte |
| **kêrik** | 1. kêra berikê 2. kêra kalanî *"hesinê bê esas, ne dibe kêrik ne jî das" |
| **kêr kirin** | 1. bi alava qutkirinê birîn 2. hesta yekî herişandin 3. bi kêrê lê xistin |
| **kêrnehatî** | 1. bêkêr 2. bêfayde3. jinkok/mêrkok*"jina kêrnehatî, avê dirijîne û dibêje:'xêr e' " |
| **kêrtik [I]** | kewre |
| **-kêrtik kirin** | bi kewreyê tûj kirin |
| **kêrtik [II]** | girtik, girnoz |
| **-kêrtik-kêrtikî kirin** | 1. girtikgirtikî kirin 2. qelîştekên biçûk tê de çêkirin |
| **kêş [I]** | kêşan *"diran biêşe, derman kêş e" |
| **-kêş û vekêş** | 1. birin û anîn, kaş û berkaş 2. bilindbûn û daketina ava deryayan; med û cezr |
| **kêş [II] û mêş** | 1. heşerat2. bihok 3. kêzik |
| **kêş [III]** | 1. pîvan 2. di pîvanê de wekhevî |
| **kêş [IV]** | 1. keyskirî 2. tiştê baş jenandî |
| **kêş[V]** | erdê ku bi ava lîçan tê avdan |
| **kêş [VI]** | kesê ku bûjenên sermestiyê dikêşe |
| **kêş [VII]** | doz |
| **kêşan/dikêşe /bikêşe** | 1. neqil kirin 2. pîvandin3. dûyê baçikê hilkişandin gewriya xwe |
| **kêşbar** | mal û milkê ku raguhastina wan pêkan e |
| **kêşe** | 1. arîşe, gelemşe, mesele 2. hevseng |
| **-kêşeya neteweyî** | meseleya miletekî |
| **-kêşeyên navneteweyî** | hevsengên di navbera koma gelan de |

| | |
|---|---|
| **kêşim** | bejn û bal |
| **kêşwer** | cazibedar, baldiz |
| **kêvjal** | kevjal |
| **kêvrîşk/kêvroşk** | sewaleke giyaxur a ku lingên wê yên pêşîn kin in û bi beza xwe ve navdar e, kerguh *"adarê kêvrîşk sibehan xwîn dimîze, nîvro xwe davêje ber siya darê" |
| **kêz** | cureyekî bihukan e |
| **kêzgilolk** | kêzika gûgerîn |
| **kêzik** | kêza biçûk |
| **kêzim** | kêzim |
| **kêzîn [I]** | kîzên |
| **kêzîn [II]** | 1. borî, lûle 2. cihoka binaxeya gemarê3. gizirîna tiştê avî |
| **kêzîn kirin** | 1. (tiştê avî) ji ber çûn 2. gizirandin |
| **kêzm** | 1. darê ku wekî piştekê tê bicihkirin 2. sing, şêt |
| **kiç** | (di zimanê zarokan de) şikestî |
| **kiç bûn** | (di zimanê zarokan de) şikestin |
| **kiç kirin** | (di zimanê zarokan de) şikandin |
| **kifş** | 1. diyar 2. vekirî 3. berbiçav 4. xuya *"destên helawxuran, timî kifş in" |
| **kifş bûn** | 1. diyar bûn 2. xuya bûn |
| **kifş kirin** | 1. diyar kirin2. xuya kirin |
| **kihêl** | hespê çê *"kihêl, di bin mêrxasan de dibezin" |
| **kil [I]** | dermanekî reş î ku li çavan didin da ku bedewiyê bide û êşan bibire |
| **-kil kirin** | çav bi kilî reş kirin*"kesê ku ket dawetê, dê xwe kil bike" |
| **-kil ji çavan dizîn** | di kirêtiyê de pispor bûn |
| **kil [II]** | her careke çelqandina meşkê |
| **-li kilê xistin** | 1. meşka dêw kiyan 2. di hêlekanê de hejandin |
| **kilam** | stran, goranî *"heft kilamên hirçê hene, hemî jî li ser hirmiyan e" |
| **-kilamên serhewa** | stranên rûniştî yên dirêj |
| **-kilam avêtin ser yekî** | di stranê de qala yekî kirin |
| **kilambêj** | stranbêj *"heke kilambêj destê xwe danî ber guhê xwe, dizane dê çi bibêje" |

| | |
|---|---|
| **kilandin/dikilîne/bikilîne** | 1. (bi meşk an jî sirsûmê) dew kiyan 2. wekî kiyanê hejandin |
| **kilaw** | pûşiya serê jinan; mêzer |
| **kilb** | mixê dirêj û stûr; mûrç |
| **kilçan** | çiraya destan |
| **kilçêv** | pênûsa kilkirinê |
| **kildan** | derdana ku kil tê de tê parastin |
| **kilekil** | dengê domdar ê ku ji kiyana meşk an jî sursûmê tê |
| **kilêb** | alava kaxkirinê |
| **kilisandin/dikilisîne/bikilisîne** | bi hev ve zeliqandin |
| **kilimkotî** | 1. kesê ku ser û sîçeyê wî baş naxuye 2. tiştê ku xuyana wî li mirovî xweş nayê |
| **kilîl** | 1. mifteh 2. zirze*"kilîla malê, bi deriyê gomê nayê" |
| **kilîl kirin** | 1. dadan 2. zirze kirin *"derê xwe rind kilîl ke, cîranê xwe diz dermexe" |
| **kilîkilî** | darkutik |
| **kilîn/dikile/bikile** | 1. (mast) hatin kiyan 2. wekî kiyanê hejîn |
| **kilor** | kade |
| **kilox** | qafê sêrî, tepa sêrî |
| **kils** | xweliyeke ji kevirê spî yê nerm tê çêkirin û xanî pê tên boyaxkirin/ seyandin*"derba evdan, esasê kilsê ye û xera nabe" |
| **kij** | seqa |
| **kijûr** | arîk |
| **kimê** | parçeyê ku pê devê derdankên şûşeyî tê girtin kimil 1. kaw û kibar 2. qure |
| **-kimil kimil meşîn** | qure qure bi rê ve çûn |
| **kin** | 1. kurt, nedirêj 2. qol*"kirasê hesûdan, hemasa kin e" |
| **kinahî** | 1. kurtî, nedirêjahî2. qolî |
| **-bi kinahî** | bi kurtasî |
| **kinare** | alaveke mûsîqayî ye, ûd |
| **kin bûn** | 1. kurt bûn 2. vekişîn 3. qol bûn |
| **kinc** | çek, libas, cil *"kinca ku ket ber pîneyan û serê ku ket ber şîretan, bi kêrî tiştekî nayên" |

| | |
|---|---|
| **-kinc li xwe kirin** | çek/cil li xwe kirin |
| **kind** | 1. zilet, ketîtî 2. bêrûmetî |
| **-kinda tirs û birsê** | bêrûmetiya newêrektî û zikbirçîtiyê |
| **kindik** | rindik û çîçik |
| **kindir** | bendê stûr ê pemboyî yê ku piranî pê devê telîsan tê dirûtin |
| **kinêr** | birîna ku tê de kêm civiyaye hev; kînor |
| **kinêzet** | 1. şirdan 2. silsile, xeleq |
| **king** | hêt |
| **kinik** | 1. bejnkurt, xirdik2. qolik |
| **kin kirin** | 1. kurt kirin 2. vekişandin 3. qol kirin |
| **kinoş** | bexîl, çikûs |
| **kinoşe** | gêzî, siqayîl |
| **kinûş** | rengê benefşî yê lap vekirî |
| **kir [I]** | guhê kin, kur |
| **kir [II]** | îş û çalakî |
| **-kira xwe kiranî kirin** | 1. tenê bi gotina xwe kirin2. dora xwe nedan tu kesî 3. mafê xwe bi ser kesî ve bernedan *"bi dinê bişêwire, kira xwe jî kiranî bike" |
| **kir [III]** | îşkar *"kiran kir û nekiran ji xwe re bir" |
| **kiranî** | kirarî |
| **-kiranî kirin** | hesab kirin |
| **kirar** | (r) di hevokê de xwediyê çalakiyê; fail, kirox, kirde |
| **kirarî** | 1. hesab 2. xwedîtî3. kirdetî |
| **kiras** | kinca tenik a ku di bin de tê lixwekirin *"bej na heyranê, her kiras lê tê" |
| **-tim di kirasekî de man** | 1. her xizan û bi awayekî bêhêz man 2. nan dîtin û bêav man |
| **-kirasê bêpêsîr li yekî kirin** | Ti]tê nemayî anîn sêrî û kepaze kirin |
| **kirdan [I]** | darikê ku gilfika hêvîr pê tê mehtkirin û vekirin; kerdenek, hestîvk |
| **kirdan [II]** | egîd û jêhatî |
| **kirdar** | karguzarê fermanên xwediyan |

| | |
|---|---|
| **kirdarî** | karguzariya fermanan |
| **kirde** | kirar |
| **kirdetî** | sexbêriya karekê pêkhatî |
| **kirekir** | dengê domdar ê ji hêrana tiştê hişk tê |
| **kirekir kirin** | ji ber hêrana tiştekî mînanî şêkir û hwd deng derxistin kirê heqê ku berdêla tiştekî kirêkirî ye; deman |
| **-kirê kirin** | tiştek heta maweye kifşkirî bi berdêlekê dan kesekî din; deman kirin |
| **kirêt** | 1. qirêj 2. gemar 3. sik, lewitî |
| **kirin/dike/bi ke** | 1. pê kanîn 2. bi cih anîn 3. danîn *"tiştê ku destan kir, kesan nekir" |
| **kiriyar** | bikirê daîmî |
| **kiriyarî** | kirîna daîmî |
| **kirîger** | bikir, muşterî |
| **kirîn/dikire/ bikîre** | 1. standin 2. bi berdêlekê tiştek wergirtin |
| **-kirîn û firotan** | standin û dayîn |
| **kirîv** | kesê ku zarok di pêşa wî de tê sinetkirin |
| **kirîvî** | kesên ku bi sinetkirina zarokan a di pêşên hev de bûne dostên hev*"mirîşk û rovî, danaynin kirîvî" |
| **kirkirk** | xaşxaşk |
| **kirkirik** | xurtxurtûk |
| **kirkirîn/dikir kire/bikirkire** | (dil) bijîn û daxwaz kirin |
| **kirkirok** | boriya ku xwarin tê re derbasî aşikê dibe |
| **kirman** | duz, keleh |
| **kirnoş** | secde |
| **kirp [I]** | levenê ter ê ku jê ka tê bidestxistin |
| **kirp [II]** | (r) giraniya dengê ku ji devan belav dibe |
| **kirpandin/di kirpîne/bikir pîne** | (r) 1. li serê rawestîn2. giranî dan ser3. kirekir kirin |
| **kirtemûk** | cureyekî çêreyê ye û nepijî tê xwarin |
| **kirt** | 1. dengê kotinê 2. bertîl, qirt 3. parçe |

| | |
|---|---|
| **-kirt û pehn** | serobero, keteber |
| **kirtekirt** | dengê domdar ê kotina tiştekî hişk an jî nîvhişk |
| **kirtekirt kirin** | ji ber kotina tiştekî hişk an jî nîvhişk deng derxistin |
| **kirtik** | parçe |
| **kirtik-kirtikî** | parçeparçeyî, parparî, zîvalzîvalî |
| **kirtopk** | kartol |
| **kirû** | rûdan, bûyer |
| **kirûr** | hejmara nîvmîlyonê |
| **kiryar [I]** | xwediyê çalakiyê; fail, kirox |
| **kiryar [II]** | pêkanîn |
| **kisp** | kusp |
| **kispik** | kuspik |
| **kiş** | 1. beradana sewalên bibask 2. banga navtêdana kûçikan |
| **kişandin/dikşîne/bikşîne** | 1. kaş kirin 2. pîvandin |
| **kişik** | lîstika mîran/lîstika sedrencê |
| **kişîn/dikişe/ bikişe** | 1. herikîn 2. vekişîn 3. (sewalên marîjok) meşîn*"av dikişe, lê aş li cihê xwe dimîne" |
| **kiş kirin** | 1. nav tê dan2. teşwîq kirin |
| **kişkişandin/dikişkîne/ bikişkişîne** | xwe wekî maran bi erdê erd re kişandin |
| **kişkişî hev kirin** | 1. kesek/ segek berdan kesekî/ segekî din 2. nav tê dan |
| **kişt û kal** | çandinî, ziraet |
| **kit** | 1. lib, heb 2. fer |
| **-deh kitî salan** | 1. deh salan li ser hev 2. tam deh salan |
| **kitan** | 1. cureyekî qumêş e2. kincên ji vî qumaşî |
| **kitêb** | pirtûk |
| **kitik** | pisîk |
| **kit kirin** | gez kirin |
| **kitkitî** | tartarî |

| | |
|---|---|
| **kitkitî bûn** | yek li vir û yek li dera han bûn; tartarî bûn |
| **kitkitî kirin** | yek danîn li vir û yek li dera han; tartarî kirin |
| **kiwê** | ko |
| **kix** | (di zimanê zarokan de) qirêj û gemarî |
| **kix bûn** | (di zimanê zarokan de) qirêj û gemarî bûn |
| **kix kirin** | (di zimanê zarokan de) qirêj û gemarî kirin |
| **kiyan/dikê/bikê** | 1. mast di meşkê de kilandin 2. çelqandin *"ê ku dêw dikê, qunê jî ba dike" |
| **kiz [I]** | bêhna kizirînê *"bîna kiz, tê ji mala diz" |
| **kiz [II]** | mirovê ku baş li ser û sîçeyê xwe dinêre |
| **kiz [III]** | zû û hêsa |
| **-kiz girîn** | 1. bi hêsanî girîn2. zûzûka girîn |
| **kizgiriyok** | 1. kesê ku bi hêsanî digirî 2. kesê ku zûzûka digirî |
| **kizik** | kezî, kirtkirtîk |
| **kizin [I]** | xortê ku hîna simbêlên wî dernehatine |
| **kizin [II]** | erdê ku ne berdar e *"mêrê serjinik, berxê mîjo, şûva bi kizin tu tişt jê dernayê" |
| **kizirandin/dikizirîne/bikizirîne** | pûrta ser çêrmî bi êgir şewitandin*"agir girtibû mala yekî, yekî jî ser û pê ber dikizirandin" |
| **kizirîn/dikizire/bikizine** | 1. pûrta ser çêrmî bi êgir şewitîn 2. ji dil û hinavan şewitîn |
| **kizîr** | 1. wezîr 2. şêwirmendê mîr 3. navberkar*"ez mîr tu mîr, kî dê bibe kizîr" |
| **kizwet** | 1. qiyafet 2. ser û sîçe |
| **kî** | çi kes *"mêr tev mêr be, jin tev jin be, kî dê muhtacê kê be?" |
| **kîjan** | ji wan çi kes/tişt*"divê mirov zanibe ku serê mirovî li ser kîjan kevirî ye" |
| **kîn** | hest û daxwaza tolhildanê |
| **-kîn girtin** | hest û daxwaza tolhildanê hewandin |
| **kîndar** | xwestiyê tolhildanê |
| **kîp** | 1. qayîm 2. şidiyayî |
| **-kîp kirin** | 1. şidiyayî girêdan2. guvaştin 3. têkûz kirin |
| **kîper** | dorana zirav |

| | |
|---|---|
| **kîr** | endamê mêraniyê û nêrtiyê; mûzî, qemo, xir*"betal ma û kîrê bavê xwe da ber dasan" |
| **kîs** | 1. derdanê biçûk; tûrik2. derdana diravan; peldank *"ew mirov nezan e, ê ku aqilê wî ji kîsê xelqê be" |
| **kîsik** | tûrikê biçûk |
| **kîso** | kûsî *"kîso jî hêkên xwe dixe bin axê û dibêje: 'heke Xwedê viyabe dê derxe' " |
| **kîşwer** | 1. werza hewayî ya deverekê; îqlîm 2. welat, herêm |
| **kîte** | (r) dengê ku bi carekî de ji devan belav dibe |
| **-kîte bi kîte** | bi hûrgilî, bi berfirehî |
| **kîtandin/dikîtîne/bikîtîne** | (r) parçe bi parçe peyv bi lêv kirin |
| **Kîwan** | gerestêrkek e |
| **kîzên** | 1. destşok 2. hemama serşûştinê |
| **Ko [I]** | gerestêrkek e |
| **ko [II]** | alavên qutkirinê yên ku devê wan nabire û divê bên tûj kirin |
| **-ko bûn** | (alava qutkirinê) tujiya xwe winda kirin |
| **-ko kirin** | (alava qutkirinê) tujî jê birin |
| **ko [III]** | di germê de şîştirgirtin û sefgirêdana pezê spî, kiwê |
| **-ketin koyê** | (pez) ji ber germê serê xwe kirin bin zikên hev û rawestîn |
| **koc** | kilîla ku bi ser ve davêjin ser deriyan |
| **koç** | 1. hicret, barkirin 2. penaberî *"zozanvanî rabûn koçê, aranvaniyan da bin boçê" |
| **koçber** | 1. muhacir, barkirî2. penaber |
| **koçberî** | 1. hicret, barkirin2. rewşa penaberiyê |
| **koçek** | 1. semajen, reqase2. zanayê êzidiyan |
| **koçer** | 1. muhacir 2. kesê ku ne şêniyê tu cihî ye*"ava çeman xwişexwiş e, koçer nabêjin: 'dewê |
| **koçerî** | 1. rewşa neakincîbûnê; muhacirtî 2. lîstikeke govendê ye *“koçerî, jê dûr e rencberî” |
| **koçêre** | koderî |
| **koçik** | hêwana pêşwazîkirina mêvanan |
| **koçk** | qesr û sera |
| **koç kirin** | (ji cihekî ber bi cihekî din ve) bar kirin |

| | |
|---|---|
| **kod** | 1. derdana ku pê zad tê pîvan 2. elb *"koda tijî, bi a vala mede" |
| **koderî** | 1. demana çêreya erdekî 2. cureyekî pirtiyê ku jin jê kirasan didirûn; çît |
| **kodik** | elbik *"kebanî bûn sisê, kodik çûn ber sê" |
| **kodqelên** | sedemê bêyomî û teşqeleyan; serxur |
| **kofî** | cureyekî pûşiya serê jinan a gelêrî ye *"jinê got: mêrik min ji te re zarokek anî, kofî û kitan danî" |
| **koga** | firoşgeha mezin |
| **koh** | 1. çiya, gir 2. kir |
| **kok [I]** | 1. reh û rîçal 2. tar û hîm *"her giya li ser koka xwe şîn tê" |
| **-koka zer** | zehferana Hindistanê |
| **kok [II]** | qelew |
| **-kok bûn** | qelew bûn, bi goşt bûn *"bet çiqasî kok dibe, ewqas cih lê teng dibe" |
| **-kok kirin** | qelew kirin, dermal kirin |
| **kokim** | kal û pîra hizhizî |
| **kokiresî** | bah, şehwet |
| **kokos** | cureyekî alava titûnkêşiyê ya ku qelûna wê xortimkî ye; nargîle |
| **kol [I]** | 1. kêrt 2. girê biçûk ê ku ji erdê zêde ne bilind e |
| **kol [II]** | bêqiloç *"bizina |
| **kol** | hînî danûyan bibe, îflah jê nabe" |
| **kol [III]** | deyûs |
| **kolan** | 1. cade, paxan 2. kuçe, ziqaq *"kolan, tu carî nakevin bi ser banan" |
| **kole** | 1. bende, evd 2. xulamokê berjewendiyên xelqê |
| **koledar** | 1. erka ku bendetiyê li ser gelan ferz dike2. xwediyê bendeyan |
| **koletî** | 1. bendetî 2. olamkarî |
| **kolê** | deyûs |
| **kolik** | 1. malika biçûk 2. xaniyê kavilbûyî |
| **-kolik lîstin** | malikanîya ku lîstikeke zarokan elîstin |
| **kolîn/dikole/ bikole** | 1. erd qelaştin 2. kûr kirin*"mezbût bikole esas, ji bo ku dil neke wasewas" |
| **lê kolîn** | **-** 1. lê gerîn 2. bi kûrbînî lê nêrîn |
| **kolîtik** | qelaxa kermeyan |
| **koloz** | kumê ji hiriyê |

| | |
|---|---|
| **kom** | civat *"agir berda komê, xwe da fêza zomê" |
| **komar** | pergala ku ramana gelemper tê de serdest e, cumhûriyet |
| **kombers** | alava ku agehiyan bi awayekî dîtbar, bihîstwer û nivîskî kom dike û radigihîne; xêvjimêr |
| **kom bûn** | 1. civîn 2. col bûn |
| **kome** | 1. girse 2. zumre |
| **komel** | 1. civat 2. cimaet |
| **komelayetî** | civakî |
| **komele** | tevgera komeke mirovan a ji bo armanceke zagonî an jî derzagonî |
| **komik** | civata piçûk |
| **komir** | 1. segê ku baş hatiye xwedîkirin 2. zordar û sitemkarê têrxwarî |
| **komir bûn** | 1. seg (ji ber xwedîkirineke baş) qelew xuya bûn 2. bi hil û heramiyê têr bûn |
| **komir kirin** | 1. seg baş xwedî kirin û qelew kirin2. bi hil û heramiyê têr kirin |
| **komkarî** | karê ku ji aliyê piraniyekê ve tê pêkanîn |
| **komkeştî** | di hêzên deryayî yên artêşê de komasiya keştiyên leşkerî |
| **kom kirin** | 1. civandin 2. berhev kirin |
| **komkujî** | qetliyam, qir |
| **kompere** | diravên ku ji bo mebestekê hatine civandin |
| **komstêr** | stêrên ku nêzîkî hev in û bi şiklekî xweser komekê çêdikin |
| **kon** | malika ku ji mû û qumaşê sext tê çêkirin, bi stûn, sing û werisan li piyan tê girtin; reşmal, xêvet *"gundê bê rez, konê bê pez, mirovê bibêje ez û ez hemî ne tu tişt in" |
| **-kon vegirtin** | reşmal ava kirin |
| **kone** | 1. hişyar 2. dekbaz |
| **konik** | tevnika pîrhevokê |
| **kop** | goc, qop |
| **kopal** | gurzê giyayî |
| **kopare** | palanê hêştiran |
| **kopel** | lûtke |
| **kopî** | gocî, qopî |
| **kop bûn** | goc bûn |
| **kop kirin** | goc kirin |

| | |
|---|---|
| **kor** | kesê ku çavên wî nabînin; nebîna *"ji çavê kor, ronahî nayê xwestin" |
| **kor bûn** | nebîna bûn |
| **korderzî** | derzîreq |
| **kordûnde** | 1. wareş, bêzarok2. kesê ku zarokên wî yên kurînî tunene |
| **korebîn** | kesê ku dîtina wî ne erênî ye; bedbîn |
| **koreçemk** | 1. kesê ku feraseta wî aloz û genî ye; ferasetkor 2. genefis |
| **koremar** | marê kor *"filan kes koremar e" |
| **koremişk** | mişkê kor |
| **korerê** | kuçeya ku pêşiya wê girtî ye |
| **korik [I]** | ronahiya boş |
| **korik [II]** | di simbilê de liba xerabî ya ku bûye rijî |
| **koritî** | rewşa nedîtina çavan |
| **korîgan** | cureyekî ketan e û kulîlksor e |
| **kor kirin** | 1. nebîna kirin2. çav derxistin 3. ko kirin |
| **kort** | çal |
| **-kort bûn** | kûr bûn |
| **-kort kirin** | kûr kirin |
| **kortal** | 1. kendal 2. çala kûr 3. hendef *"kor bi destê kor bigire, dê tev têkevin kortalê" |
| **kortik** | çalika biçûk |
| **-kortika qûnê** | qelîşteka qûnê |
| **kosp** | asteng |
| **koşîn/dikoşe /bikoşe** | ketin hevrikiyê |
| **kotek** | lêdan |
| **kotekî** | bi darê zorê |
| **kotel** | avahiyê ku ji bo bîranîna bûyerekî li cihê bûyerê tê avakirin |
| **koter** | xemla stûyan |
| **kotewarî** | tenezul, daqûlî |
| **kotin/dikoje/ bikoje** | bi diranan gest kirin û xwarin*"dar bi kotinê, însan bi gotinê" |
| **kotir** | kevok |

| | |
|---|---|
| **kotkoto** | kesê ku gotegota wî êdî her kesî aciz dike |
| **kov** | 1. xwarbûna ber bi hundir ve 2. hotik |
| **koval** | helezonî, levaliyayî |
| **kovan** | 1. xem û keder 2. derd û keser 3. bêrî |
| **kovar** | weşana li gorî demeke diyarkirî |
| **kovik** | alava rêtinê ya ku pê tiştê avî li derdaneke devbiçûk tê neqilkirin*"aqil, bi kovikê nekirine seriyan" |
| **-kovika qûne** | qelîşteka ku li nava her du hêtan e |
| **kovî** | 1. hov 2. wehşî |
| **kox** | 1. xaniyê xerabûyî 2. kenefe 3. punga mirîşkan; koxik |
| **koxik** | cihê ku mirîşk, werdek û hwd lê tên êwirandin |
| **koy** | çiya |
| **koyistan** | erdê çiyayî |
| **koz** | êwirgeha berx û karan*"berxê xelqê, di koza mirovî de mezin nabe" kozere kaya girs; qesel |
| **kozik** | çeper, sîber, qelaçe |
| **-kozik danîn** | kemîn û tele danîn |
| **ku [I]** | gihanekek e |
| **ku [II]** | 1. heke 2. eger |
| **ku [III]** | kîder *"ker bi ku de here jî cardin ker e" |
| **kubar** | kaw û nazik |
| **kubarî** | kawî û naziktî |
| **kuç** | 1. kuncik 2. kevir |
| **kuçe** | riyên di nav bera avahiyan de; ziqaq *"dawiya derewan, kuçe ye" |
| **kuçik** | sê kevirên ku datînin bin sîtilên ser êgir, xaçirgan *"agirê kuçikan, timî germ e" |
| **kuçke** | riya ku dawiya wê girtî ye *“dawiya derewan, kuçke ye” |
| **kudandin/di kudîne/biku dîne** | 1. vekişîn 2. domandin*”dijminatî bi kuştinê, rê bi kudandinê” |
| **kudik** | 1. têjika hirçê 2. têjika hêştirê *"dema ku hirç pîr bû, kudik bi gunikên wî dilîzin" |
| **kufik** | afnik |

| | |
|---|---|
| **kufikî** | afnikî |
| **kuj** | goşe, guç, çim |
| **kujer** | kuştox, qatil |
| **kujme** | miqdar |
| **kukurd** | kurkût/kerkût |
| **kul** | 1. birîn 2. keser 3. derd *"çavê bikul, ji yê kor çêtir e" |
| **-kulê bixwe!** | ziqûm û jehrê bixwe! |
| **kulab** | 1. çakil 2. pençe |
| **kulang** | sermil |
| **kulav** | 1. raxistina ku ji livayê hatiye çêkirin 2. baraniya şivanan a ku ji hiriyê ye |
| **kulb** | têrnexur |
| **kulbe** | kilêb |
| **kule** | perdeyeke tenik a ji bo xweparastina ji pêş û mêşan; tulbend |
| **kulek [I]** | pêseqet, lingor, pêgoc *"baz bi bazan, qaz bi qazan, mirîşka kor bi dîkê kulek re" |
| **kulek [II]** | 1. paceyên bi ser banê avahiyê ve 2. kunên bi ser banan ve*"diz û malxwe bibin yek, ga ji kulekê re jî dertê" |
| **kuleke** | kulek, lingor |
| **kuleng** | derdanka darînî ya ku tiştên avî dikinê |
| **kulêmek** | her du hestiyên ku lingan bi gewdeyî ve girêdidin |
| **kulfet** | zar û zêçên mirovî*"kulfet, şûrê dudev in li pişta bavan" |
| **kulfik** | 1. di tenûran de kuna dûkêşk 2. kunên bêfilan 3. kunên di goman de wekî kulekan dihêlin *"beza pisîkê heta ber kulfikê ye" |
| **kulibîn/dikulibe/bikulibe** | 1. ji ser hiş çûn 2. har bûn 3. zû birçî bûn*"mitrib kulibî, def qetiya" |
| **kulik** | nexweşiya ajalan a ku dibijine mirovan û ajalên din jî |
| **kulindir** | kundirê ku hundirê wî tijî goştê hêrandî dikin û wisa dipijînin |
| **kulî [I]** | hespê pîrê |
| **kulî [II]** | libên berfê *"ha kulî xwar, ha qulî xwar" |
| **kulîçe** | 1. kadeyên hûrik2. bîşî |
| **kulîlk** | bişkuya serê çêre û çiqilê darê ya ku rengrengî vedide *"demek a kulîkan e, yek a sosinan e" |

| | |
|---|---|
| **kulîn/dikule/ bikule [I]** | 1. gocegoc meşîn 2. lingîrî bi rê ve çûn |
| **kulîn [II]** | 1. jûra erzaq û nivînên malê 2. di reşmalê de beşa ku ji bo erzaqê malê hatiye veqetandin*"barana havînê, şil nekir binê kulînê” |
| **kulkulîn/dikulkule/bikulkule** | bi zor û zehmetî xwe bi erdê re kişandin û wisa meşîn |
| **kulm** | 1. kefedest, felqedest2. çeng, gulmist*"bi kulman meçin dirêşê" |
| **kulovank** | gopika sêrî |
| **kum** | pûşiya serê mêran*"derziya xwe, di ber kumê serê xwe re kir" |
| **-kum avêtin** | pev çûn |
| **-kum dirandin** | rik hatin, bihêrs bûn |
| **-kum ketin çavan** | 1. di rewşeke nebaş de bûn 2. fors lê şikestin |
| **-kumê yekî li serê yekî din bûn** | di kar û tevgerê de şibihîn hev |
| **kumik** | serê kuvarkan |
| **kumişandin/ dikumişîne/ bikumişîne** | 1. hilweşandin2. daqurtandin |
| **kumişîn/dikumişe/bikumişe** | 1. hilweşîn 2. helîn |
| **kumzirx** | puşiya seran a ku ji tundiya derbeyên derveyî diparêze |
| **kun** | 1. qulik 2. qûn |
| **kuncik** | quncik *"jina xelqê ramûsanek e li kuncikekî, hespê xelqê meydanek e li pêşbirkekî" |
| **kuncî** | cureyekî zadê ku jê rûn tê bidestxistin û bi ser kadeyan de tê reşandin |
| **kund** | cureyekî teyrên şevê ye; bûm *"gotine: ‘kundo mirî pir in an zindî?' gotiye: 'zindiyek tenê zêde ye, ew jî di bin emrê jinê de ye' " |
| **kundêle** | têjika berazî |
| **kundir [I]** | cureyekî sewzeyan e û pijandî tê xwarin*"kundirê mîranî, çêtir e ji şekirê şîranî" |
| **kundir [II]** | mirovê bêkêr |

| | |
|---|---|
| **kunêr** | kînor |
| **kunker** | alava ku pê tiştan qul dikin |
| **kur [I]** | law, zarokê nêrîn*"mêl ne ji kurê qenc re dayne, ne jî ji yê xerab re" |
| **kur [II]** | sewala ku guhên wê biçûk in |
| **kur [III]** | li zozanan erdê nermehur (bê kevir) |
| **kurap** | lawê apî; kurmam |
| **kurbeşk** | cureyekî sewalên çolê ye |
| **kurd** | gelê ku ji Tofanê virdetir li Navçêmkê û doraliyên wê dijî |
| **kurdayetî** | kurdbûn |
| **kurdewerî** | têkildarî neteweya kurd |
| **kurdî** | zimanê gelê kurd |
| **kurdînas** | pisporê ziman û wêjeya kurdî |
| **kurdnas** | pisporê çand û dîroka gelê kurd |
| **kureke** | kesê ku ji bilî xwarin û rîtinê bi kêrî tiştekî nayê |
| **kurik** | lawik |
| **kurisandin/dikurisîne/ bikurisîne** | 1. kotin û hêrandin 2. peritandin û pizirandin 3. komir kirin |
| **kurisî** | hêrandî û pizirî |
| **kurisîn/dikurise/bikurise** | 1. dan kotin û hêrandin2. peritîn û pizirîn3. komir bûn |
| **kurî** | 1. cehşik 2. caniya viringî *"aqilê kurî, caniya dêlî" |
| **kurk** | keçêça hêkşêlandin û cûcikderxistina ajalên bibask ên malê û firindeyên çolê |
| **-ketin kurkê** | 1. (ajalên bibask û firindeyên çolê) li ser hêkan melisîn û cûcik derxistin 2. (mirov) di cihekî de rûniştin û derneketin derve 3. pir egle bûn |
| **kur kirin** | 1. kurtisandin, qusandin 2. tiraş kirin*"kê karê pir kiriye, keziya xwe kur kiriye" |
| **kurm** | cureyekî bihukên biçûk e; dikeve birînan, fêkî û sewzeyan û wan xera dike |
| **-(dil) kurmê tiştekî kişandin** | xwestin û dil kirkirîn |
| **-kurm tê de gerîn** | 1. netebitîn2. bi tatêla tiştekî de hilketin û daketin |
| **kurmam** | kurap, pismam |

| | |
|---|---|
| **kurmanc** | 1. milekî gelê kurd e 2. kesê ji vî milî |
| **kurmancî** | 1. zaravayê herî berbelav ê zimanê kurdî 2. têkildarî dab û nêrîtên kurmancan |
| **-kurmanciya reşbelek** | axaftina ku her kes tê digihêje |
| **kurmet** | lawê meta mirovî |
| **kurmî** | tiştê ku kurm ketinê |
| **kurmî bûn** | ji ber ketina kurman xerab bûn |
| **kurn** | 1. hewzê avê 2. afirê ku ji textikan çêdikin û bireke pêz dikare tê de ka û cehî bixwe |
| **kursî** | rûniştekeka ku li ser çar pepikan disekine |
| **kurt** | kin û nedirêj *"emrê xayinan kurt e, dilê wan pirtepirt e" |
| **-kurt û kurmancî** | bêyî ku axaftin dirêj bibe |
| **kurtayî/kurtasî** | kutahî |
| **-bi kurtasî/kurtayî** | bi kinahî |
| **kurtan** | palanê ker û hêştirê*"ker, bê kurtan naçe êş" |
| **kurtane** | heriya ku pê dîwar tên seyandin |
| **kurtane kirin** | dîwar bi heriyê seyandin |
| **kurt bûn** | kin bûn |
| **kurte** | 1. muxteser 2. kineber |
| **kurtebirî** | gotina kin û kurt; bi kinayî |
| **kurtepist** | paşbêjî |
| **kurtêl** | bermayiya xwarinê |
| **kurxal** | lawê xalê mirovî |
| **kurxaltî** | lawê xaltiya mirovî |
| **kuskî** | derdanka darînî û mezin a ku şerab tê de tê meyandin |
| **kuskusandin /dikuskusîne / bikuskusîne** | çavên xwe korevîçkî vekirin û girtin |
| **kusp** | kesê kin û qelew |
| **kuspe** | 1. qalikên silqan2. her cure xwarina xurt a ku pê sewalan dermal dikin |

| | |
|---|---|
| **kuspik** | xirdikê kok |
| **kuspo** | kusp |
| **kuşim** | qerf û tinazeyên soxkirinê |
| **-li kesekî kuşim kirin** | ji bo soxkirinê bi yekî tinaze kirin |
| **kuşte** | kilsa zeliqok a ku pê dîwar tên seyandin |
| **kuştin/dikuje /bikuje** | 1. mirar kirin 2. qetl kirin3. ji holê rakirin *"ji kuştiyê di ber xelqê re bibêjin ku wî ez kuştime" |
| **kuştî** | 1. kesê ku hatiye kuştin; meqtûl, mirarbûyî2. kesê ku kuştiye; qatil, kujer |
| **kuştox** | qatil, kujer |
| **kuta** | 1. dawî 2. encam |
| **kutahî** | 1. dawiya dawiyê2. aqibet |
| **kuta bûn** | 1. qedîn 2. xelas bûn |
| **kuta kirin** | 1. qedandin2. xelas kirin |
| **kutan/dikute /bikute [I]** | 1. lê xistin 2. çikilandin, çikandin 3. sihirandin, gayîn *“dilê tirsok, timî dikute” |
| **kutan [II]** | lêdan |
| **kutek** | 1. mîrkut 2. spartek, stûn |
| **kutilk** | xwarineke û ji goştê hêrandî tê çêkirin |
| **kuvarik** | cureyekî çêreya ku wekî sîwanan hêşîn dibe û pijandî tê xwarin; kumik, karî |
| **kuwar** | 1. cihê ku mêşa hingivî tê de hingivî dihêle 2. enbara zêd, çala gênim *"qûtê kuwarê, heta biharê" |
| **kuxik** | 1. zekema gewriyê2. kuxtekuxta ji kezeb û pişikê |
| **kuxîn/dikuxe /bikuxe** | 1. bi zekema gewriyê ketin2. kuxtekuxt kirin |
| **kuxtekuxt** | kuxîna bi ser hev |
| **kûç** | sewala kol (a bê qiloç) |
| **kûçik** | seg *"kûçik, bi kurman namire" |
| **kûp** | cêr |
| **-kûpê aqilan** | şêwirmendê zana |
| **-kûpê şerabê** | kesê ku herdem sermest e |
| **kûpik** | şerbikê biçembil; cêrik |
| **kûr [I]** | di lêş de valahiya bêhestî ya ku doran tê de ne; navzik |
| **-erik kûra zikê wî çendel e!** | peh peh zikê wî wekî terikekî ye! |
| **kûr [II]** | binê wê dûr û ne tenîsk *"çiyayên bilind bê rê nabin, newalên kûr bê av nabin" |
| **kûrahî** | bindûrî, netenîskî |
| **kûr bûn** | (binî) dûr bûn, netenîsk bûn |
| **kûre** | semaxa hesinkaran; hêtûn |
| **kûrevan** | kesê ku ber kûreyê dixebite |

| | |
|---|---|
| **kûrebîn** | dûrebîn |
| **kûrekûr kirin** | (bi deng) kiz girîn |
| **kûrik [I]** | pûrta ku li ser rîs û kincên hûnandî dikeve |
| **kûrik [II]** | kûreya êgir a biçûk |
| **kûrîn/dikûre /bikûre** | 1. zûrîn 2. kiz girîn |
| **kûr kirin** | 1. baş kolandin2. kort kirin û li binî asê kirin |
| **kûsik** | şûşe |
| **kûsî** | heywaneke ku hem di bejiyê de hem jî di avê de dijî û bi qalik e*"dibêjin: 'kûsî tu çima pîs î? dibêje: 'Xwedê li eniya min nivîsî" |
| **-kûsiyê dêm** | kûsiyê ku dûrî avan dijî |
| **-kûsiyê avî** | kûsiyê ku di avan de dijî |
| **kût** | nanê ku baş nepijiyaye û didine kûçikan |
| **-kût xwarin** | bertîl xwarin |
| **kûtî [I]** | kûçik, tûle |
| **kûtî [II]** | kesê ku bi nexweşiya cuzamê ketiye |
| **kûtî bûn** | bi nexweşiya cuzamê ketin *"hebûn strûyê mêran e, tunebûn kûtîbûn e" |
| **kûto [I]** | zarokê kurînî yê viringî |
| **kûto [II]** | tûle |
| **kûz** | 1. cêrê avê 2. cêrê ku berê gencîne tê de vedişartin*"ha kevir li kûzî ket, ha kûz li kêvir ket" |
| **kûze** | cureyekî heywanên bêhnkirêt e |
| **kwîrinc** | livajen |
| **kwîrincî** | livajenî |
| **kwîstan** | zozan |

# L

| | |
|---|---|
| **l/L** | tîpa pazdehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê diranî ye û awayê belavbûna wê herikî û rexkî ye |
| **la** | 1. alî, hêl 2. kêlek |
| **labikandin/dilabikîne/bilabikîne** | 1. tev li hev kirin 2. lewitandin |
| **labikîn/dilabike/bilabike** | 1. lewitîn 2. tev li hev bûn |
| **lac** | law, kur |
| **lacik** | lawik, kurik |
| **laçik** | pûşiya serê jinan*"li bejnê nêrî, bi zêran kirî, laçik rakir kerika gurî ye" |
| **-laçika jinan dan serê xwe** | ji mêraniyê ketin û bênamûsî qebûl kirin |
| **laçin** | cureyekî solan e |
| **ladan/ladide/lade** | ji rê derketin |
| **laf** | gotin |
| **lafazan** | kesê ku dizane gotina wî digihê kîderê |
| **laflafok** | çêreya badayî |
| **lahorî** | cureyekî şûrên Hindistanê ye |
| **lajwerd** | bûjena ku bi şêweyên curecureyî ji madenan hatiye bidestxistin |
| **lak** | 1. kûtê kûçikan 2. hoçik 3. bekereya ku davêjin ser kombersê |
| **lakîn** | derdana ku ji bo xwarin û vexwarina kûçikan tê veqetandin; savêr |
| **lal** | 1. bêzar û bêziman2. tat *"azadî hat dinê, zimanê lal hat vekirinê" |
| **lal bûn** | 1. tat bûn 2. aniqîn |
| **lalengî** | cureyekî porteqalan e û qalikê wan zûtir jê dibe |
| **lalijîn/dilalije/bilalije** | lalote bûn, ziman negerîn |
| **lalik** | 1. tatik 2. sinî *"lalika şikestî, çêtir e ji a xwestî" |
| **laloşî** | aloşî, melaqî |
| **laloşî kirin** | aloşî kirin, melaqî kirin |

| | |
|---|---|
| **lalote** | 1. aniqî 2. zimangiran |
| **lam** | erzên |
| **lame** | valahiya di navbeyna hestiyê hinarikê û erzenê de; gep |
| **lan** | hêlîna kovî û dirindeyan*“hirç lana xwe ji bîr nake, çivîk jî hêlîna xwe” |
| **landik** | hêlekan, hêleçan |
| **lanet** | qewirandina bi nifiran |
| **lanetî** | kesê ku bi nifiran hatiye qewirandin |
| **lanet kirin** | 1. jê re beddua kirin 2. ji hafê avêtin |
| **lap** | 1. tam 2. pir |
| **lap kûr** | **-** gelekî kûr |
| **laper** | rûyekî kaxezê |
| **lapûşk** | 1. pençe 2. kulab |
| **laq** | goştê jar |
| **lar [I]** | 1. bê dê 2. êwirgehe ga û gamêşan; tewle |
| **lar [I]** | xwar |
| **lar bûn** | xwar bûn |
| **lareş** | cureyekî nexweşiyan e |
| **lar kirin** | xwar kirin |
| **lasar** | 1. baldar 2. înadkar |
| **lasayî** | qulebî, sexte |
| **lasayî kirin** | teqlîd kirin, sextekarî kirin |
| **laser** | sêlav, lehî, lêkend |
| **lask** | saq, bist |
| **laş** | beden, term *“laş laşê mêşê, deng dengê gamêşê” |
| **laşe** | 1. kelax 2. goştê mirdar *"laşe li ku derê, qijik li wê derê” |
| **laşgiran** | 1. canazar, xwerenedîtî 2. pêgiran |
| **lat** | 1. zinarên meht; teht2. parçe 3. coya mezin |
| **-lat ajotin** | 1. sohbet kirin, galegal kirin 2. bi axaftinê dem bihurandin |
| **latik** | 1. kevirê biçûk 2. kerdî |
| **lava** | 1. dua 2. tika, rica |
| **lavakar** | 1. duakar 2. kesê ku tika û ricayê dike |

| | |
|---|---|
| **-lavakarê nefsa te me** | ji nefsa te re dua dikim |
| **lava kirin** | tika kirin, rica kirin |
| **lavayî** | lava |
| **lavij** | 1. newayên dînî; beyt 2. stran |
| **law** | kur *"bav çi seg be, dê law jî ew seg be” |
| **lawan** | jiyana di nav têkberên bedew de |
| **lawaz** | 1. hejar 2. zeîf |
| **lawazî** | 1. hejarî 2. zeîftî |
| **lawik** | kurik |
| **lawir** | rawir |
| **lawlaw** | laflaf |
| **lay/layen** | 1. tûş/dûş 2. alî 3. teref, ta |
| **layengîr** | 1. terefgir 2. tagir 3. alîgir |
| **layîq** | 1. munasib 2. bikêrhatî |
| **layîq bûn** | 1. munasib bûn 2. bi kêr hatin |
| **laylac** | 1. çavçil û silek2. tezepêkhatî |
| **laylacî** | 1. silektî 2. tezedîtîtî |
| **lazim** | 1. pêwist 2. bikêrhatî |
| **lazim bûn** | 1. pêwist bûn2. bi kêr hatin |
| **lazimî** | hewcetî, pêdivî |
| **lazût** | cureyekî zadê ku jê rûn tê bidestxistin û wekî gênim jî tê bikaranîn; garis |
| **lebat** | 1. tevger 2. bizav, hereket *"sibat lebat, kewanî li nava malê ma mat" |
| **lebatî** | (r) hevoka ku kirarê wê karî bi xwe dike |
| **lebikandin/dilebikîne/bilebikîne** | 1. kirin zorê, li qaqa reş asê kirin2. feşilandin |
| **lebikîn/dilebike/bilebike** | 1. ketin zorê, li qaqa reş asê bûn 2. feşilîn |
| **lebitandin/dilebitîne/bilebitîne** | 1. bezandin2. leqandin, livandin |
| **lebitîn/dilebite/bilebite** | 1. livîn 2. leqîn 3. bezîn*“barê kerê çiqas giran be, guhên wê dilebitin” |

| | |
|---|---|
| **lebûdî** | livajen |
| **lec** | 1. devjenî 2. nîqaş |
| **leflefok** | çêreya badayî |
| **legan** | tasa tehtevêlkî ya mezin |
| **legleg** | cureyekî balindeyên kovî û lingdirêj a ku bi biharê tên erdên germ, xwarina wan beq, mişk û mar e |
| **leheng** | 1. egîd 2. qehreman |
| **lehik** | pêvek, îlawe |
| **lehikandin/dilehikîne/bilehikîne** | pê ve kirin, lê îlawe kirin |
| **lehikîn/dilehike/bilehike** | pê ve zeliqîn |
| **lehî** | sêlav, laser, lêkend*"ava lehiyan, da ser geliyan” |
| **lehîm** | bûjena ku hêsin bi hev ve dizeliqîne |
| **lehîm kirin** | hesin bi hev ve kirin |
| **lehn** | lan, hêlîna hirçê |
| **lek** | bûjenên ku ji eslê neftê çêbûyî |
| **lekan** | sola berfê |
| **lekaş** | sola bênalçe û paşîvekirî |
| **lekitandin/dilekitîne/bilekitîne** | likijandin |
| **lekitîn/dilekite/bilekite** | likijîn |
| **lele** | qeyda ku davêjin stûyên tawanbarên bixeter û hêsîran lele kirin qeyd avêtin stûyî |
| **lem [I]** | bistikên petêxan ên li ser rûyê erdê *“dinya dem e, gavinan petêx e gavinan lem e” |
| **lem [II]** | lehiyên rûbêr |
| **lem [III]** | lep |
| **lemç** | milç |
| **lemçelemç** | milçemilç |

| | |
|---|---|
| **lemçelemç kirin** | milçemilç kirin |
| **lemelem** | lemper bi lemper |
| **lemelem kirin** | gotin di devê xwe birin û anîn; mizemiz kirin |
| **lemisîn/dilemise/bilemise** | 1. bizdîn 2. (çerm) vekişîn 3. qutifîn |
| **lem kirin** | serê tiştekî zot kirin/tûj birîn |
| **lemlate** | 1. lûs 2. girse |
| **lemper [I]** | sinî, berkeşok |
| **lemper [II]** | 1. lehiyên zeryayê 2. çelq û herka ava boş |
| **lenc** | xwar û badayî |
| **lencîn/dilence/bilence** | bi lexerî û giranî meşîn |
| **leng** | pêgoc, kulek, lingor |
| **lenger [I]** | hesinê keştiyan ê ku pê erdê lengergehê ve tê girêdan |
| **-lenger berdan** | (keştîvan) gihiştin qeraxê û rawestan |
| **lenger [II]** | siniya fireh |
| **lenger [III]** | firokeya fezayî |
| **lengergeh** | li qeraxa deryayekê rawestgeha ku keştî lê diêwirin |
| **lep** | 1. penc 2. dest *“her şêrek, bi lepê xwe ye” |
| **leplep** | dengê domdar ê ku ji ketina bêemad tê |
| **-lelepa dêv** | derketina peyvan bi awayekî beletewş |
| **-lepelepa mêweyan** | ketina bêemad a mêweyên terixî |
| **lepelep kirin** | bê emad ketin erdê û raweşîn |
| **lepik** | lixwekirina destan |
| **lep kirin** | penc kirin |
| **leq** | 1. hej 2. ziq |
| **leqandin/dileqîne/bileqîne** | 1. livandin 2. lebitandin 3. hejandin4. ziqinandin *“mirov nakeve govendê, heke ketê jî divê xwe bileqîne” |

| | |
|---|---|
| **leqayî bûn** | rastî hatin, pergî hatin |
| **leqîn/dileqe/ bileqe** | 1. livîn 2. lebitîn |
| **leqleqok** | tiştê ku di cihê xwe de dileqe û natebite |
| **lerizandin/dil erizîne/ bilerizîne** | 1. hejandin, leqandin 2. ricifandin |
| **lerizîn/dileriz e/bilerize** | 1. hejîn 2. ricifîn *"an bike û melerize, an jî meke û melerize" |
| **lerz** | 1. hej, leq 2. ricaf |
| **lerzek** | 1. hezek, cihe bi herî û gil 2. ricaf lerzeta cureyekî nexweşiyan e |
| **lerzok** | 1. hejok 2. leqleqok |
| **leş** | cendek |
| **-leş kelaştin** | rewşa cendekekî teselî kirin |
| **leşkelêşî** | di bijîşkiyê de pisporiya temtêla cendekan |
| **leşker** | 1. esker 2. şervan3. pêşmerge *"leşkerê Romê ye, nan li ser çongê ye" |
| **leşkergeh** | artêşgeh |
| **leşkerî** | 1. eskerî 2. şervanî3. pêşmergetî |
| **let** | parçe |
| **letandin/dile tîne/biletîne** | 1. heytandin 2. jê re 'hiş be' gotin 3. deng lê birîn û nizm kirin |
| **let bûn** | parçe bûn |
| **leteme** | 1. eyba mezin2. teşqeleya herwe 3. belaya bêpere |
| **-letemeya rûyê dê û bavan** | şerm û soxiya ku ji kirinên zarokan rastî dê û bavan tê |
| **let kirin** | parçe kirin |
| **letok** | aştbûyî û biaqil |
| **leva** | qisim, par, beş |
| **leva kirin** | par ve kirin |
| **leven** | qamûş, qamir |
| **lev piçikîn** | li hev alîn, wekî gocan bûn |
| **lewaş** | 1. nazik 2. diltenik |
| **lewçe** | 1. devçepel 2. bêrûmet |

| | |
|---|---|
| **lewhe** | çarçive |
| **lewitandin/dilewitîne/bilewitîne** | 1. labikandin2. qirêj kirin |
| **lewitî** | 1. berbad 2. qirêj*"lewitî dora xwe jî dilewitîne, şehitî bîsa xwe jî dişehitîne" |
| **lewitîn/dilewite/bilewite** | 1. labikîn 2. qirêj bûn |
| **lewleb** | toterîka ku pê bendê satilê dadiliqînin nava bîrê |
| **lewma** | 1. lewre, loma 2. ji ber vê egerê |
| **lexer** | teral, xêr(-r) |
| **lexer** | teralî, xêr(-r-)îtî |
| **leylan** | serab, revrevk |
| **leymûn** | cureyekî mêweyên tirş e |
| **lez [I]** | hereket |
| **lez [II]** | biecele *"digerî li dewleta lez, xwedî ke rez û pez" |
| **-bi lez û bez** | bi ecele û rev *"bûk anî bi lez û bezo, li ser de rez û pezo, şivika malê hê jî ezo" |
| **lezandin/dilezîne/bilezîne** | 1. ecele kirin 2. bezandin, revandin |
| **lezet** | çêj, tahm |
| **lez girtin** | 1. zû kirin 2. bi ecele tev gerîn |
| **lezgîn** | kesê ku karê xwe bi zûyî dike |
| **lezgînî** | bizûyî, biecele |
| **lê [I]** | berevajî hevoka navborî; lêbelê, belam |
| **lê [II]** | baneşana ji bo mêzayan/ jinan |
| **lê anîn** | 1. peyde kirin, pêk anîn 2. wergerandin |
| **lê banîn** | 1. pê de ketin2. kumişîn ser 3. pê beled bûn |
| **lê belê** | feqet, lê, belam |
| **lêbezîn** | lêdan |
| **lêbok** | melaq, aloş |
| **lêbokî** | melaqî, aloşî |
| **lê borîn** | 1. jê bihurîn 2. efû kirin, bexişandin |
| **lêç** | 1. dererêtî 2. xulşî |

| | |
|---|---|
| **lêçan** | kesê ku ji rastiyê veqetiyaye |
| **lêçûn** | xerc û mesref |
| **-lêçûnên malbatê** | xerc û mesrefên malê |
| **-lêçûnên leşkerî** | xerc û mesrefên leşkeriyê |
| **lê dan** | 1. lê bezîn 2. lê xistin 3. rencandin, zecirandin |
| **lêder** | kesê ku li amûreke mûsîqayî dide |
| **lê gemar dan** | 1. dorpêç kirin 2. gemaro kirin |
| **lê gerîn** | 1. lê kolîn 2. pey ketin 3. mutale kirin |
| **lê guncîn** | 1. bi kêr hatin2. munasib bûn |
| **lê hatin** | 1. bi kêr hatin2. layîq bûn 3. jê sûdwer bûn *"lê hat bazirgan e, lê nehat xwediyê warê wêran e" |
| **lê hûr bûn** | 1. ponijîn 2. li ser pokinîn lêk anîn 1. li hev anîn 2. du xeydok li hev anîn |
| **lêkdan [I]** | pevçûn |
| **lêkdan [II]** | bihevdana du hejmaran |
| **-xişteya lêkdanê** | alava ku rênîşandêra pevdana jimareyan e |
| **lêkend** | sêlav, lehî |
| **lêker** | (r) karê ku di hevokê de tê kirin |
| **lê ketin** | 1. lê asê bûn 2. tê gerîn 3. îsabet kirin |
| **lê kirin** | 1. kinc lê kirin 2. dîwar jênîn 3. nav lê danîn 4. hêrandin *"aşekî bihêle ku tu arvanê xwe lê bikî" |
| **lê kolîn** | 1. lê gerîn 2. mutale kirin 3. lê hûr bûn |
| **lêk ve kirin** | senifandin |
| **lêlav** | berfa bibaran; şilope |
| **lêm** | xweliya narîn a ku piştî lêkendê li qeraxên çeman dimîne |
| **lêmişt** | 1. lehî 2. qirş û qeselê ku bi lehiyê re tê lê nihêrîn 1. mêze kirin2. dîtin |
| **lê niştin** | siwar bûn |
| **lênûsk** | defter |
| **lêp** | hîle, dek, fend û fût |
| **lê pêçan** | 1. lê alîn 2. lê alandin |
| **lê pirsîn [I]** | 1. pirsiyar kirin 2. jê pirsîn |

| | |
|---|---|
| **lê pirsîn [II]** | 1. hal û wext pirsîn, kêfxweşî dan 2. raya wî wergirtin, pê şêwirîn |
| **lêpok** | rezîl û riswa |
| **lêqewimî** | kesê ku tûşî bûyerekê hatiye; mexdûr, mezlûm |
| **lê rabûn** | bi êş an jî nexweşiyekê ketin |
| **lê re hatin** | 1. hîn bûn û bernedan 2. elimîn û ji xwe re kirin serinc |
| **lê siwar bûn** | 1. lê niştin2. derketin ser, bazdan ser 3. gayîn |
| **lê sor bûn** | 1. lê hûr bûn2. îsrar kirin |
| **lê sor kirin** | 1. teşwîq kirin2. nav tê dan 3. niçandin4. fîtandin |
| **lêv** | 1. goştê li dora dêv 2. kêlek *“gotina ku bikeve nava du lêvan, dikeve nava du gundan” |
| **-lêva xwe gez kirin** | pir ecêb man, heyirîn |
| **-lêv daxistin** | mirûzê xwe tirş kirin |
| **lêvelêv** | hetanî dêv tijî |
| **lêvlêvî** | cureyekî nokan e û qelandî tê xwarin |
| **lêvdûdik** | kesê lêvstûr |
| **lêvşotirk** | kesê ku lêva wî a jêrîn zêde dirêj e |
| **lê vegerandin** | 1. radest kirin 2. bersivandin 3. lê asê bûn |
| **lê xebitîn** | 1. pê re mijûl bûn 2. (da ku bê qedandin) hewl dan |
| **lê xêr ve anîn** | şikir kirin |
| **lê xistin** | 1. lê dan 2. kutan*“ker ji lêxistinê re, hesp ji bezê re” |
| **lêzim** | eqreba, xizim |
| **li** | (r) daçekek e cih û warekî dinimîne |
| **-li cem** | li ba, li hinda *“li cem bêaran, her bihar e” |
| **-li dar e** | a niha tê pêkanîn |
| **-li gel** | di gel, ji bilî vê |
| **-li gel vê yekê** | beramberî vê yekê |
| **-li gor** | 1. li hember 2. li cem *“li gorî makê, golik pak e” |
| **-li paş** | li pişt *“bigire û here, li paşxwe menêre” |
| **-li pey** | bi dûv *“ba pê ket, kûçik li pey ket” |

| | |
|---|---|
| **-li pêş** | 1. li ber, ne li paş2. li hember, li dij*“dost li pêş mirovî dipeyive, dijmin li paş mirovî” |
| **lib** | heb |
| **-lib û lib** | yek bi yek, heb û heb |
| **li bendê man/sekinîn** | li hêviyê û di raçaviyê de man/sekinîn *“her kes li benda dora xwe disekine” |
| **li ba bûn** | 1. berbiba bûn2. hejîn 3. daweşîn *“kaya kevn, li ba nabe” |
| **li ba kirin** | 1. dan ber bayî2. hejandin 3. daweşandin li ber gerîn lavayî lê kirin, tika jê kirin |
| **li ber xwe ketin** | 1. mehcûb bûn 2. şerm kirin |
| **li dar xistin** | 1. saz kirin2. çêkirin |
| **libê!** | kerem ke!/fermo! |
| **li hev civîn** | 1. kom bûn2. hatin ser hev |
| **li hev hatin** | 1. peyman danîn 2. sulh kirin |
| **li hev kirin** | îtifaq kirin |
| **li hev rast hatin** | pergî hev hatin/leqayî hev hatin |
| **li hev rûniştin** | 1. danişîn2. mutale kirin |
| **lihevxistin** | 1. tevdan 2. bezînhev |
| **li hêviyê mayîn/sekinîn** | 1. li bendê man/sekinîn2. raçav kirin, çav li rê bûn |
| **lihêf** | nivîna ji hirî û pemboyî ya ku dema razanê davêjin ser xwe |
| **lijne** | 1. koma lêkolîneran2. desteye rêvebiran |
| **likijandin/dilikijîne/bilikijîne** | 1. çêrandin 2. elimandin 3. karên kirêt lê dan kirin |
| **likijîn/dilikije/bilikije** | 1. çêrîn 2. (li ser sergoyan) gerîn |
| **likij** | hestîkoj |
| **limbîs** | xortima fîlê ya ku bi kêrî berhevkirina çêreyê û vexwarina avê tê |
| **ling** | endamê ku ji binê pê dest pê dike hetanî serê kulêmekan tê *“barê serê bêaqil, ling dikişînin” |

| | |
|---|---|
| **lingçepel** | lingberevajî *“ aqilê sivik lingçepel e” |
| **liq** | 1. şax 2. malbend 3. di artêşê de koma ku ji çar heng û hin yekîneyên pêwist pêk tê |
| **lisf** | 1. ser û sîçe 2. xuyabûna bi temtêla kesekî din de; dilq |
| **liva** | hiriya berxan |
| **livajen** | kesê ku ji hiriya berxan kulavan çêdike |
| **livandin/diliv îne/bilivîne** | 1. leqandin 2. bezandin 3. hejandin |
| **livîn/dilive/b ilive** | 1. leqîn 2. hejîn 3. hereket kirin *"ba neyê, pel nalivin” |
| **livlivok** | hejhejok |
| **lixab** | gem |
| **lixab kirin** | gem kirin |
| **lixêz** | zernîq, zemq |
| **liyan** | werzişa tîlê |
| **lîhaz** | hesinekî dirêj û sertûj ê ku ji bo rakirina keviran tê bikaranîn (aliyekî dixin bin kevirê asê û hêza xwe didine ser aliyê din hetanî ku ew bê wergerandin); lom, qerase |
| **lîl** | 1. heriya ku ji xweliya nazik çêdibe 2. pijik |
| **lîlandin/dilîlî ne/bilîlîne** | bi tilîliyan bang kirin |
| **lîlik [I]** | reşika çêv |
| **lîlik [II]** | cureyekî darên çolê ye |
| **lîloz** | beybûn |
| **lîme** | tîke |
| **lîme kirin** | tîke kirin |
| **lîmelîmeyî kirin** | parçeparçeyî kirin |
| **lîmon** | leymûn |
| **lînc** | pêkutî |
| **lînc kirin** | avêtin bin lingan û perçiqandin |
| **lîrandin/dilîrî ne/bilîrîne** | bi tilîliyan qîjîn |
| **lîre** | gilêyên sor ên ku ji ber pêvedana bihukan di çermê mirovî de çêdibin |

| | |
|---|---|
| **lîs** | 1. mels 2. hêlin 3. lan*“lîs karê mirîşkan, bîs karê mêran e” |
| **lîsîn/dilîse/bi lîse** | 1. melisîn2. nişîn |
| **lîstik** | 1. bazî 2. cergebez3. govend *“kesê ku têkeve lîstikê, dê milan jî hilde” |
| **lîstin/dilîze/ bilîze** | 1. bazî kirin 2. reqisîn *“bi zikê birçî nayê lîstin” |
| **lîstî** | 1. bazîker 2. reqas*“bi xwe lîstî, bi xwe de mîstî” |
| **lîstok** | 1. pêlîstok 2. tîtik û vîtikên zarokan |
| **lîtav** | 1. herîrêtik 2. hezge |
| **lîtik** | xilîtk |
| **lîwa** | alaya leşkerî |
| **lîwan** | 1. gem 2. îskan |
| **lo!** | baneşana ji bo nêrzayan/ mêran |
| **lod** | 1. kom, tomar 2. gutle, lûs |
| **lod kirin** | 1. kom kirin 2. bi ser hev de anîn 3. keys kirin, dan ser hev |
| **lok** | hêştira barkêşanê ya hêrik/mûkurt *"barê bûkan, barê lokan” |
| **loke** | pembo |
| **lom** | 1. mizreq, rim 2. hesinekî rimkî yê ku pê kevirên giran ji erdê derdixin |
| **lome** | 1. sitamî 2. gazinc* “lome, an li dû ne an li rû ne” |
| **-lomeya pîvazê li sîrê genî kirin** | gotin ji ehlê wê re venekirin |
| **lome kirin** | 1. gazind kirin2. şermezar kirin |
| **lop** | 1. kincên stûr 2. parî, qot |
| **lopik** | kutilkên ku hin xwarinên din jî dikine navê |
| **loq** | 1. şel, tîke 2. merdane, gurdan |
| **loqandin/dil oqîne/biloqî ne** | 1. bezandin 2. (hesp) loqloqo kirin |
| **loqîn/diloqe/ biloqe** | 1. bezîn 2. loqloqo bûn |
| **loqloqo** | bezeke hespan a ku siwaran aciz dike |
| **lorandin/dilo rîne/bilorîne** | 1. zêmar ristin2. bi şewat stran |

| | |
|---|---|
| **lorik** | hêlekana zarokên viringî *"bûk di sorikê de, dergûş di lorikê de” |
| **lorî** | newaya nivandina zarokan |
| **lostik** | cihê bi av û herî |
| **loş** | nanê lewaş |
| **lotê** | jina qunek |
| **lotik** | 1. hindirik, çirtikavêtin2. vîz |
| **-lotik avêtin** | 1. hindirik dan 2. xwe hilavêtin 3. hîz dan 4. vîz dan *“diya zavê lotik davê, diya bûkê kûkekûk e” |
| **lotikxane** | cihê xwehilavêtin û cergebezê; reqsxane |
| **lotke** | navgîneke raguhastinê a biçûk e û li ser avan diçe |
| **lotkevan** | 1. ajokarê lotkeyê2. masîvanê bi lotkeyê |
| **lotim** | îkramiye |
| **lowî** | cureyekî sewzeyan e û pijandî tê xwarin |
| **-lowiyên ter** | lowiyên ku nehatine hişk-kirin |
| **lûç** | 1. herş 2. spîkirî |
| **lûç bûn** | 1. herişîn 2. spî bûn |
| **lûç kirin** | 1. herişandin 2. qeşartin |
| **lûdo** | newaya şivanan a ku pê keriyên xwe diajon |
| **lûl** | fetrûm |
| **-lûl kirin** | fetrûm kirin |
| **lûlaq** | geh, teşk |
| **lûle** | 1. quletîn 2. xortim, borî 3. di çekan de boriya fîşengê |
| **lûleper** | kulîlkek e |
| **lûleyî** | di endazeya boriyan de |
| **lûlekî** | wekî boriyan |
| **lûlik** | boriya amanan a ku tê re tiştê avî dirijînin |
| **lûr** | lîl, pijik |
| **lûs [I]** | lîs |
| **lûs [II]** | parta biçûk |
| **lûs [III]** | şimşat |
| **lûslûsî** | partpartî |
| **lûslûsî kirin** | partên biçûk jenîn |

| | |
|---|---|
| **lûsik** | 1. keçêç 2. parta biçûk, qûçek giya |
| **lûtke** | nikilê herî jorîn ê bilindahiyekê; zîrwe |
| **lûtî** | mêrê qûnek |
| **lûtîtî** | qûnektiya mêran |

# M

| | |
|---|---|
| **M/m** | tîpa şazdehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê lêvkî ye û awayê belavbûna wê girtî û difinî ye |
| **ma** | 1. qey 2. tu dibêjî hema wisan e *“ma ji mirinê wêdetir tiştek heye?” |
| **-ma bavê te ji bavê xelqê mezintir e?** | tu çima qîma xwe bi vî tiştê heyî nayînî û zêdebariyê daxwaz dikî? |
| **-ma tu di guhê gê de bûyî?** | çima heta niha tu li ku bûyî? |
| **macera** | serpêhatî |
| **macûn** | 1. helîse 2. merhem3. dermanê merhemkî |
| **maç [I]** | di cot de destika ku digirin û pê xeta cot eyer dikin |
| **maç [II]** | gihandina lêvan bi lêv an dêmên yeka din; ramûsan |
| **-maça jînê** | (ji bo bi ser xwe de bê) pifkirina devê kesê bêhnçikiyayî an jî fetisî |
| **-maça mirinê** | qîlçikandina xwînmijan di canê yekî de |
| **maçî kirin** | ramûsan, paç kirin *“destê şêx maçî |
| **mekin** | , ew şêx ne Qutbê Razî ye, tac û teylesana serê wî, gişk xebata destê sar û tazî ye” |
| **mad** | mehde |
| **made** | tiştê ku di gerdûnê de cihekî digire û baristeya wî heye; darin, bûjen |
| **madek** | gamêşa mê |
| **maden** | bûjenên kîmyayî |
| **madenî** | heyberên ji bûjenên kîmyayî |
| **mader** | dayik |
| **maderşahî** | dayiksalarî |
| **maf** | fermana mîrî ya derheqa kirin û nekirina karan de; heq |
| **mafdar** | xwedî-heq |
| **-mafên mirovan** | heqên însanan |
| **-mafê çarenûse** | heqê hilbijartina rêbazekê |

| | |
|---|---|
| **-mafê rewa** | heqê meşrû |
| **-mafên takekesî** | heqên şexsî/ferdî |
| **mafnas** | kesê ku heq û huqûqê dizane |
| **mafxur** | neheqê ku destdirêjiya heqê xelqê dike |
| **mafxurî** | rewşa destdirêjiya heqê xelqê |
| **mahir** | 1. jêhatî 2. pispor |
| **mahî** | hestiyê spî |
| **mahlû** | malû |
| **maht** | di lîstikê de dor |
| **-maht kirin** | lîstik jê birin |
| **mahû** | 1. beraza mê 2. jina bêxîret |
| **mak** | dayik, dê *“li gor makê golik pak e” |
| **-maka derewan** | kaniya viran |
| **-makedibistan** | dibistana heta 6 saliyan |
| **-makezagon** | qanûna esasî ya welatekî |
| **makêş** | alava parzûnandinê ya mezin |
| **makîne** | alavên ku mirovan ji bo hêsankirina jiyanê çêkirine û bi hêza gêreba, gaz, agir, nift, tav û destan dixebitin |
| **makûk** | mekok |
| **mal [I]** | 1. holik 2. xanî 3. xanûman *“dil meke jina bi mêr, diçe malê û dike ji bîr” |
| **-mal li mîratan geriyaye** | xwedî miriye û xelqê jî mîrateya wî xwariye |
| **-Mala Xwedê** | 1. Kebeya şerîf 2. mizgeft *“Mala Xwedê ava be, qirik bi kevokê qayîl nabe” |
| **-malî ava!** | mala te xana Xwedê! *“kê gotiyê: ‘dizo: malî ava’ ” |
| **mal [II]** | 1. serwet 2. milkiyet3. sermiyanî 4. rastmal *“dibêje: ‘koro bide malê min!’ ew jî dibêje: ‘neyê mala min!’ ” |
| **mal [III]** | 1. di malperekî de rûpela sereke 2. rûpela aîdî bikarhênerekî |
| **malbat** | ezbat, aîle |
| **malbavan** | malbat *“malbavanê bûkê gavan e, qelenê bûkê giran e” |

| | |
|---|---|
| **maldar** | zengîn, sermiyandar*“maldar, ji malê xwe ditirsin” |
| **-maldar bûn** | dewlemend bûn *“mirov deyndar nebe, maldar nabe” |
| **male** | alava seyandina dîwaran a bi gêç, herî û hwd |
| **malekêş** | seyakar |
| **malêle** | lomê ku pê giranî tên leqandin |
| **malêz [I]** | lîstika çavgirtonekê |
| **malêz [II]** | qirêja gilêzkî |
| **-malêz girtin** | qirêja gilêzkî pê ketin |
| **malhazirî** | xwarina ku wê gavê li malê hazir e |
| **malik** | 1. holik 2. beyta helbestê |
| **malikiyet** | xwedîtî |
| **malinc** | male |
| **maliq** | tiştê ku wekî gerestêrkekê di hewa de bê destek sekinî ye |
| **malistin/dimalêze/bimalêze** | dalêstin |
| **maliştin/dimale(dimalêje) / bimale (bimalêje)** | 1. paqij kirin 2. gêzî kirin *“bi kevîrê sivik, her kes xwe dimalêje” |
| **malkambax** | malik bi devê kulê de çûyî |
| **malker/malkir** | kesê ku ji bo başkirina rewşa xwe ya aborî dikoşe |
| **malketî** | muflis, babidest |
| **malko** | malkambax |
| **malmezin** | xanedan |
| **malmîrat** | 1. malko, malkambax2. malketî |
| **malname** | kaxeza ku cure û hejmara bûjenên bazirganiyê lê tên nivîsandin |
| **malnişîn** | karnişîn |
| **malofî** | sewala ku hînî mirovan dibe û êdî bêtirs di nava malê de digere |
| **malper** | cihê ku (ji bo ragihandina zanyarî, nûçe û danûstandinan) di tora ragihandinê ya navneteweyî(înternetê) de qeyd bûye |
| **malû** | darê meht ê ku li ser erdê cotkirî digerînin |
| **malxezûran** | xezûrgelan |

| | |
|---|---|
| **malxwe** | 1. xwediyê malê2. rêvebirê kar û barên malê *“mala bê malxwe kes nizane ku mezin kî ye” |
| **malxwetî** | sexbêrî û rêvebiriya malê *“malxwetî kete destê kurî, rizqê salekê di carekê de birî” |
| **malxur** | 1. malxwe 2. mîratxur*“heke hat malxurê malê ye, heke nehat qeda li salê ye” |
| **malzarok** | di zikê nifşê mê de cihê ku zarok tê de çêdibe; pizdan |
| **mam** | 1. birayê bavê mirovî; ap 2. ji bo mirovên mezin peyveke giramîdanê ye *“mamo ne li mal e, mala mamo bi galegal e” |
| **maman** | pispora ku jina ducanî diwelidîne |
| **mambiz** | karxezal |
| **mamik [I]** | elameta ku di nav rez, zevî û bîstanan diçikilînin da ku giyandar jê bitirsin û ziyanan nekin |
| **mamik [II]** | tiştonek, têderxistinok(wekî: kofiya xezalê, totî newalê-=zîpik) |
| **mamir** | mirîşka yek salî ya ku hêj hêk ne kirine |
| **mamiz** | xezal |
| **mamoste** | 1. seyda, fêrker, muelim 2. di karekî de pispor; ustad *“diya baş, ji hezar mamosteyî çêtir e” |
| **mamostetî** | karê hînkirin û wanedanê |
| **man/dimîne /bimîne** | 1. sekinîn 2. rawestîn |
| **mand** | pêşeroj, dahatû |
| **mandel** | derew, şaş, nerêk |
| **mandel kirin** | 1. gotin an jî kiryareke nerêk pûç kirin2. înkar kirin |
| **mandî** | westiyayî *“destê mandî li ser zikê têr e“ |
| **mandî bûn** | westîn |
| **-mandî nebin** | (ji bo kesên ku li ser karekî ne) ji we re quwet be! |
| **mandî kirin** | westandin |
| **manek** | hespê ader |
| **manend** | 1. mîna, notla2. hinkuf |
| **mang** | 1. heyv 2. meh |
| **-mang girtin** | rojiya meha remezanê girtin |
| **manga** | çêlek *“mangaya me mir, dewê me biriya” |
| **mangêr** | alava ku bi ser zeviyên cotkirî dixin û pê kersengan rast dikin |

| | |
|---|---|
| **mangêr kirin** | mangêr bi ser zeviyê gerandin |
| **maqûl** | 1. tiştê ku dikeve aqilan 2. torinê êlekê*“maqûlê kûçikan, tajî ye” |
| **mar** | cureyekî sewalên xişok, bêpê û jehrdar e*“ecelê marî tê, di nava riyê de diçe” |
| **-marê pêzik** | 1. marê pir jehrdar 2. xedar û xayîn |
| **-mar û mûr** | lawir û bihuk/ heşerat |
| **maravî** | marê avê |
| **marez** | raxistek |
| **margestî** | kesê ku marî pê vedaye *“margestî, ji werisî jî ditirse” |
| **margîse** | cureyekî sewalên ku li gor erdê ku lê ye reng diguhere û dişibihe gumgumokê |
| **margîsk** | sewaleke ji malbata gumgumo-kan e, çêrmê wê meht û birqonek e |
| **maristan** | cihê ku mar lê pir in; lana maran |
| **marîjok** | sewalên bêling ên ku xwe bi erdê re dikişînin |
| **marîs** | oleder |
| **marlûlk** | kurmikên heriyê |
| **marmark** | cureyekî kurmên doranan e |
| **marmasî** | cureyekî masiyên ku dişibihine maran |
| **marmêlk** | margîse |
| **marmij** | 1. kesê ku jehra marî dimije 2. bêwijdan3. kedxur |
| **mas** | alava ku pê hespan tîmar dikin |
| **mase** | textikekî biling e û tiştên malê datînin serê masî sewaleke avê ye û cureyên wê pir in *“masî, di behrê de dibe hût” |
| **masîgir** | masîvan |
| **masîvan** | kesê ku bi torê masiyan digire |
| **mast** | şîrê kelandî yê havênkirî*“dewê ceribandî, ji mastê neceribandî çêtir e” |
| **mastêrik** | kovik |
| **masûr** | darikê ku tayekî lê dizîn û ji firêta tevnê re derbas dikin |
| **masûl** | pilte |
| **masûlke** | edaleyên lêş; bazû; kezî |
| **maşel** | dafika masiyan |
| **maşelan** | cureyekî bayên hênik e |
| **maşik** | nîskên kesk |

| | |
|---|---|
| **maşîn/dimaşe/bimaşe** | kevn bûn û peritîn |
| **maşot** | kurmê belçikan |
| **mat** | şaşwaz, mehtel |
| **mat bûn** | şaşwaz bûn |
| **matem** | şîn |
| **mat kirin** | şaşwaz kirin |
| **mawe** | dem, muhlet |
| **max [I]** | merşên malê |
| **max [II]** | navbera du darên ku avêtine ser banê xênî |
| **max [III]** | gutle |
| **maxane** | malxerab |
| **maxda** | kirêt |
| **maxda bûn** | kirêt bûn |
| **maxolan** | kesê ku bi nexweşiya maxolaniyê ketiye |
| **maxolanî** | 1. cureyekî nexweşiya derûnî ye 2. xemgîniya kûr û dirêj |
| **mawe** | 1. heyam 2. mesafe |
| **mayende** | tiştê ku mayina wê zêde ye; daîmî |
| **mayepûç** | kesê îflaskirî |
| **mayepûçî** | rewşa îflasê; malwêranî |
| **mayî** | 1. baqiye, serata 2. ji besiyê zêdetir *"pelên mayî, ji yên bihurtî çêtir in" |
| **mayîn/dimîne/bimîne** | 1. sekinîn, rawestîn 2. li holê sekinîn *"ga dimire çêrm dimîne, mêr dimire nav dimîne" |
| **mayînde** | mayende, daîmî |
| **may tê kirin** | 1. mudaxele kirin 2. dest tê kirin |
| **-maytêkirina navxweyî** | destdirêjiya dijî karê xelqê yî hundirîn |
| **maytêker** | 1. tevlêbûyî 2. destêkirî |
| **maz** | beranê pêncsalî |
| **mazî/mazû** | cureyekî daran e |
| **mazîçin** | kesê ku darên mazî diçine |
| **mazûvan** | 1. malxwe 2. mêvandar 3. mazîçin*"mazûvanî, ne karê axa ne" |

| | |
|---|---|
| **me [I]** | cînavka /em/ê ya tewandî |
| **-me pûş kuta** | ked û emelê me vala çû |
| **me- [II]** | pêşgira neyîniyê ya ku tê ber lêkerê |
| **meaş** | mehmiz, mehanî |
| **mebest** | 1. niyêt, qesd 2. armanc |
| **mecal** | 1. qudûm 2. hêza şiyanê 3. derfet *"heke ecel hat, mecalê nade" |
| **mecaz** | wateya ku rasterast nehatiye nimandin |
| **mecazî** | watedariya nerasterast |
| **mecbûr** | bêgav |
| **mecbûrtî** | bêgavî |
| **mechûl** | nediyar |
| **meclis** | dîwana rêvebiriyê |
| **medeniyet** | şaristanî |
| **medenî** | şareza |
| **medenîtî** | şarezayî |
| **medrese** | 1. dibistan 2. xwendegeha feqîhan |
| **mefa [I]** | 1. belaş 2. bê dirav û bê heq *"li ku mefa ye, li wir bav û bira ye" |
| **mefa [II]** | fayde, behre |
| **-mefa jê girtin** | jê behreyek wergirtin |
| **mefadar** | behregirtî |
| **mefer** | hêvî, omit |
| **meferdar** | hêvîdar, omitwar |
| **mefsik** | 1. kevgir 2. hesik |
| **meh** | 1. mang 2. her 30 rojên salê *"ji mehan û salan, mirov carekî tenê dibe mêvanê xalan" |
| **-meha raborî** | her 30 rojên rabihurtî |
| **mehandin/dimehîne/bimehîne** | 1. tune kirin, ji holê rakirin 2. binevat kirin |
| **mehane** | 1. mehanî 2. weşana30 rojî carekê |
| **mehanî** | destheqa 30 rojên xebatê |
| **meharet** | pisporî û pîşekarî |

| | |
|---|---|
| **mehder** | 1. meydan 2. şefaet3. hêwan |
| **mehes** | alava ku pê hespan tîmar dikin, mas |
| **mehfûr** | cureyekî kaxetîta bedew e |
| **mehfûrî** | amanên ji kaxetîta bedew |
| **mehîn** | hespa mê |
| **mehîr** | girara dêw |
| **mehkeme** | saziya darizandin û sezadanê; dadgeh*"mehkemeyê, ji kesî re mal nekiriye" |
| **mehmiz** | destheqa mehekî; mehane |
| **mehne** | 1. wate 2. behane*"mehneya nedayînê: 'weris, li gêris e' " |
| **mehnewî** | 1. razber 2. giyanî, derûnî |
| **mehol** | mêkut |
| **mehr** | nikah |
| **-mehr kirin** | 1. nikah kirin2. li xwe helal kirin |
| **mehrîfet** | 1. pîşe û pisporî2. zanîn û feraset*"mehrîfeta keran, zirîna wan e" |
| **meht** | 1. rast 2. tehtevêlkî3. pehn |
| **-meht kirin** | 1. rast kirin2. pehn kirin *"her kes dewsa lingê xwe meht dike" |
| **mejî** | mêjî |
| **mekat** | xûgiya çêregehê |
| **mekok** | di raçandinê de derbaskirina tayî ji firêta tevnê |
| **mekteb** | dibistan, xwendegeh*"mal, mekteb e" |
| **mektûb** | name |
| **mela** | 1. mele, îmam 2. alimê diyanetê; seyda*"bi ilmê melayî bike, lê bi emelê meleyî meke" |
| **-mela şito** | melayê sexte yê ku dixwaze bi kum û tizbiya xwe xelqê bixapîne; zirmela, sofiyê sextekar |
| **melatî** | 1. îmamtî 2. alimtiya diyanetê; seydatî |
| **melaje** | goştikê ku di gewriyê de hêşîn dibe |
| **melaq** | 1. riyakar 2. kesê ku ji hinekan re laloşiyê dike |
| **melavî** | 1. biryardarî 2. xîret 3. hewl |
| **melavî kirin** | 1. biryardar bûn 2. xîret kirin 3. hewl dan |
| **melbend [I]** | menteşe, qulabe |
| **melbend [II]** | herêm |

| | |
|---|---|
| **melbend [III]** | 1. bingeh 2. komele |
| **mele [I]** | kêzikek e |
| **mele [II]** | mela |
| **melegan** | pir girs, şelegan |
| **meleganî** | mezinahiya bêteşe, şeleganî |
| **meleke** | şiyan, qabiliyet |
| **meleme** | bêndera kutayî |
| **melevan** | sober, avjen |
| **melevanî** | soberî, avjenî |
| **melevanî kirin** | soberî kirin, avjenî kirin |
| **melik** | mîr *"xwediyê sebrê, melikê Misrê" |
| **meliktî** | mîrîtî |
| **meliqandin/dimeliqîne/bimeliqîne** | 1. (bi awayekî destkarî) mêwe stewandin2. daliqandî hiştin |
| **meliqîn/dimeliqe/bimeliqe** | 1. (mêwe) di çiqilan ve daliqî man û terixîn2. daliqî man |
| **melisandin/dimelisîne/bimelisîne** | 1. lîs kirin2. keçêç dan girtin |
| **melisîn/dimelise/bimelise** | 1. lîs kirin 2. keçêç girtin *"kêvroşk çiqasî |
| **bimelise** | , dê gavek zêde lê bikeve" |
| **melkeb** | selika mezin a girover |
| **melkemot** | Ezraîl eleyhiselam, melekê mirinê |
| **melkes** | gêzî, siqayîl |
| **melok** | gurz |
| **melû** | gurzên çandiniyê |
| **melûl** | 1. xemgîn 2. derdoyî |
| **memik** | ber, guhan, hingil |
| **memikdank** | kinca ku çiçikan dikinê; berdank |

| | |
|---|---|
| **memleket** | 1. bajar 2. welat |
| **men** | pîv |
| **menberahî** | pîvaneya berahiyê |
| **mend** | 1. kaşbûn, 2. bêqudûmî û bêhêzî |
| **-mend** | paşgireke ku di dawiya navdêrê ve dizeliqe û wateya xwedîtiyê didê |
| **mendebûr** | 1. teral, lexer2. qirêj |
| **mendirêjahî** | pîvaneya dirêjahiyê |
| **mengiranî** | pîvaneya giraniyê |
| **mengî** | mane, armanca jiyanî |
| **menî** | 1. avika mêran a ku jinê ducanî dike 2. avika ajalên nêr a ku ajalên mê avis dike |
| **menkûrahî** | pîvaneya kûrahiyê |
| **menzel** | jûr |
| **menzîl** | 1. mawe 2. mesafeya kêşa çekê |
| **meqam** | 1. nivîsgeha serekan2. ziyaretgeha aliman3. rê û rêbazên vegotina stranan |
| **meqes** | 1. cawbir 2. hebring |
| **meqsed** | 1. mebest 2. niyêt, meram |
| **mer** | 1. bêra rast 2. pêmer |
| **meram** | mebest, armanc |
| **meran** | kulîlka asmînê |
| **meraq** | hesta hînbûnê |
| **meraqdar** | heweskarê hînbûnê |
| **merasim** | dêlindêz |
| **merbend** | hesinê ku li lingekî hespê dixin û bi singekî ve girêdidin |
| **merc** | 1. şert 2. werz 3. rayîş |
| **-merc girtin** | reqabet kirin, ketin pêşbaziyê |
| **-merc sepandin** | şertê xwe dan qebûlkirin |
| **-merc û peyman** | şert û ehd |
| **mercname** | 1. şertname2. rayîşname |
| **merd** | 1. comerd, destbelaş2. mêrxas |

| | |
|---|---|
| **merdan** | mêkut |
| **merdane [I]** | 1. bi destbelaşî2. bi mêrxasî |
| **merdane [II]** | loq, bangurdan |
| **mered** | pace |
| **merek** | kadîn |
| **merez** | kul û nexweşî |
| **merfet** | derfet |
| **merg** | giyan |
| **mergonek** | bangurdan |
| **merheba!** | bi xêr hatî! |
| **merhebatî** | xêrhatinî |
| **-merhebatî ji hev birîn** | têkilî ji hev qut kirin |
| **merhele** | 1. ast 2. rade |
| **merhem** | dermanê helîsekî/ macûnkî |
| **merhemet** | hesta diltenikiyê*“merhemeta ne li cih, merezê tîne” |
| **-merhemet kirin** | lê şewitîn, guneh pê hatin |
| **-merhemet ket ber dilan** | hate însafê |
| **merisandin/ dimerisîne/ bimerisîne** | 1. daqurtandin2. lê xistin3. bêhêz hiştin |
| **meritandin/ dimeritîne/bi meritîne** | 1. herişandin2. birîndar kirin, spîldaxkî jê derbas kirin |
| **meritîn/dime rite/ bimerite** | 1. herişîn 2. birîndar bûn *“destê bin kêvir, bikêşî dê bimerite nekêşî dê biherişe” |
| **meriv** | mirov *“meriv, bi çiravan diçe delavan” |
| **merivatî** | mirovatî *“merivatî bi baran, hesab bi misqalan” |
| **merixandin/ dimerixîne/b imerixîne** | mexel kirin |

| | |
|---|---|
| **merixîn/dimerixe/bimerixe** | mexel hatin |
| **merî** | mirov *“merî, bi zenga ber diranan têr nabe” |
| **merîk** | bişkoj, qumçe |
| **merkane** | derdanka şûşeyî ya bi devik |
| **merkez** | navend |
| **mer kirin** | 1. pêmer kirin2. bi bêran rêç kirin |
| **mermer** | cureyekî kevirên avasaziyê ye |
| **mermî** | fîşeng, gule |
| **mersef** | sinî |
| **merş/merşik** | 1. raxistina nava malê 2. bêrkun, ferşik*“gava zarok ket meha şeşan, quna wî dayne ser merşan” |
| **mertal** | 1. alava ku ji derba şûran pê berevanî tê kirin 2. alava ku pê berevanî tê kirin |
| **merx [I]** | cureyekî darên ku zivistanan belçikên wan danaweşin |
| **merx [II]** | newalên rûbaran |
| **merz** | cihokên ku li dora zeviyan tên kolandin (da ku lêkend nekevê) |
| **merzel** | gor *“hemû merzelên kêlsipî ne ziyaret in, hemû kesên şaşiksipî ne serdar in” |
| **mesele** | 1. arîşe, gelş 2. mijar, babet |
| **meselok** | kurteçîrokên watedar û qerfî |
| **mesîlk** | 1. newala bêav 2. rûbarok, newalok |
| **mesqel** | bûjena biriqandinê |
| **-mesqel kirin** | 1. biriqandin2. çirûsandin |
| **mesaxtin/dimesêxe/bimesêxe** | mezaxtin |
| **mesh** | gerandina destê şil li ser endamê pêçayî |
| **mesh kirin** | destê şil li ser endamê pêçayî gerandin |
| **mesîl** | 1. çemê biçûk 2. newalên sêlavan 3. dibûr*“avê vexwe ji kanîesîlan, ne ji mesîlan” |
| **mest** | 1. serxweş 2. heyirî3. cureyekî solên bênalçe ye |
| **mest bûn** | 1. serxweş bûn2. heyirîn |
| **mest kirin** | 1. serxweş kirin2. heyirandin |

| | |
|---|---|
| **meş** | 1. bez 2. rêveçûn*“guhên erdê, meşa mûriyê jî dibihîzin” |
| **meşale** | çira |
| **meşfen** | kevirê mirîşotiyê |
| **meşhûr** | navdar |
| **meşk** | eyarê ku tê de mastî dikilînin û dikên |
| **meşkale** | xurcika çermîn |
| **meşkar** | kesê ku çalakiya meşê pêk tîne |
| **meşq** | pêşamadehî |
| **-meşqa cengê** | ji şerekî re amadehiyên pêşîn |
| **-meşq dan** | hînî karekî kirin |
| **meşrû** | di çarçiveya helaliyê û qanûnan de; rewa |
| **met** | 1. xwişka bavê mirovî2. ji bo pîrejinan peyveke rêzdariyê ye *“em çûn mala metê, metê jî çû civatê” |
| **metbex** | jûra aşpêjiyê |
| **methelok** | gotinên navdar ên kurt û watedar |
| **metirsî** | fikar, tirs |
| **meterîs** | kozika cengê |
| **metran** | popê filehan |
| **mewîj** | tiriyên hişk-kirî*“mewîja hebanan, ne dixwe ne dide cîranan” |
| **mewqî** | meqam |
| **mewranî** | daxwaza xwarinê ya li ba jinên ducanî |
| **-mewranî ketin ber** | (jina ducanî) dil bijinandin xwarinekê |
| **mewzî** | senger |
| **mexel** | cihê ku sewal lê westa xwe datînin |
| **-mexel hatin** | (sewalên çarpê yên ku goştê wan tê xwarin) veketin, velezîn*“bizin bizin e, berê cihê xwe pêkol dike û paşê mexel tê” |
| **-mexel kirin** | sewal velezandin |
| **mexlûq** | hemû heyberên ku ji aliyê Xwedê ve hatine afirandin |
| **mexreb** | serê êvarê |
| **-nimêja mexrebê** | nimêja tarîbanê |

| | |
|---|---|
| **mey** | şerab, eraq |
| **meya [I]** | hêstira mê |
| **meya [II]** | havên, firşik |
| **meyan** | puxte, gewher |
| **meyandin/dimeyîne/bimeyîne** | 1. havên kirin2. dawerivandin |
| **meyav** | ava sekinî ya ku naherike |
| **meydan** | 1. hol 2. hêwan3. mezada sewalan *“ji tivingê re nîşan, ji hespê re meydan” |
| **-meydan nedîtin** | firsenda xwestî bi dest nexistin |
| **meyger** | kesê ku di meyxaneyê de meyê digerîne; saqî |
| **meyîn/dimeye/bimeye** | 1. havên girtin 2. dawerivîn |
| **meymûn** | qird *“meymûn, di çavê diya xwe de xezal e” |
| **meyrok** | marlûlk |
| **meyter** | kesê ku hespan hîn dike |
| **meyxane** | 1. firoşgeha eraqê2. cihê vexwerina eraqê |
| **meyxur** | eyaş, sermest |
| **meyizandin/dimeyizîne/bimeyzîne** | 1. nihêrîn2. temaşe kirin 3. dîtin |
| | sûqa kirîn û firotanê; bazar |
| **mezaxtin/dimezixîne/bimezixîne** | 1. bertelef kirin, îmha kirin 2. dêrz kirin, xerc kirin |
| **mezaxtî** | mal û milkê serfbûyî; înfaq |
| **mezel** | merzel *“mezelê keran, zikê gur e” |
| **-mezelê merivan jê dûr be!** | Xwedê merivan jê biparêze |
| **mezin [I]** | 1. girs 2. bilind*“astenga mezin, li derê mala mirovî ye” |
| **mezin [II]** | 1. rûspî 2. serok 3. pêşengên gelekî*“bi ya mezinan bike, wan cejnek berî te xwarine” |
| **mezinahî** | 1. girsî 2. bilindahî*“aqil ne ji mezinahiyê ye, ne jî ji biçûkahiyê ye” |

| | |
|---|---|
| **mezin bûn** | 1. girs bûn2. bilind bûn 3. gihiştin, stewîn |
| **mezintî** | mezinahî *“biçûk biçûktî, mezin mezintî” |
| **mezlûm** | kesê ku zilmek li sêrî hatiye kirin |
| **mezr** | 1. dûgel, dewlet 2. welat 3. sazî |
| **-Mezra Botan** | Dûgela Botiyan2. welatê botiyan, Navçêmk |
| **mezran** | afiran, sazkirin |
| **mezrandin/dimezrîne/ bimezrîne** | 1. afirandin2. çêkirin |
| **mezrandî** | 1. afirandî 2. çêkirî |
| **mezrîb** | 1. newala ava lêkendê2. şirotan |
| **mê** | 1. sewala ku avis dibe, dizê an jî hêkan dike 2. navdêra ku wekî mêza hatiye pejirandin *“bila mê be, şîr qismet e” |
| **mêbaz** | kesê ku bi namûsa jinan re dilîze |
| **-mê bûn** | ji nêrtiyê ketin mêhîn 1. mêza 2. tiştê ku mêzatiya wê li pêş  e |
| **-mê kirin** | 1. ji mêraniyê xistin 2. xesandin |
| **mêj** | 1. kevin 2. rabihurtî |
| **mêjî** | 1. endamê ku di seriyan de ye û giyanewer bi wî karên xwe bi rê ve dibin2. hiş, aqil *“mêjiyê sivik, barê giran e” |
| **-mêjî şêlî kirin** | 1. (ji ber temenê dirêj) hiş negerîn û bûyer bi bîr neaîn 2. gêj bûn |
| **mêjîkok** | 1. mêjiyê biçûk2. parçeyê navendî yê ku kombersê dixebitîne |
| **mêjû** | roj û dema ku bûyer qewimiye |
| **mêjûnas** | kesê ku roj û demên rûdanan nas dike |
| **mêkew** | kewa mê |
| **mêkut** | mîrkut |
| **mêl** | 1. hesta ber bi tiştekî ve 2. xwarbûna ber bi aliyekî ve |
| **mêldar** | 1. berwar 2. heweskar |
| **mêlede** | 1. meşale, şemal2. çira |
| **mêlak** | kezeb |
| **mêr** | 1. mirovê nêr 2. wêrek*“axa jin û mêran, ji hev e” |
| **-mêr ser re heram e** | lehengê herî qenc e |

| | |
|---|---|
| **-mêrê kulê** | ruhistînê stûbir; celad |
| **-bi mêr kirin** | (jin) bi mêrekî re zewicîn, şû kirin |
| **mêrandin/di mêrîne/bimê rîne** | 1. nîşan dan 2. pêşandin |
| **mêranî** | 1. egîdî 2. nêrtî*“mêranî, ne karê her kesî ye” |
| **mêrg** | erdê ku çêreya wê tê çinîn; çêregeh |
| **-mêrg û çîman** | 1. gulzar2. seyrangeh |
| **mêrgdirûn** | giyaçinîn |
| **mêrik** | mirov |
| **mêrkok** | 1. qelsemêr 2. şindokê mêran |
| **mêrkuj** | 1. qatil 2. kujer3. kuştox *“destê te, ne destê mêrkujan e” |
| **mêrxas** | xasmêr, egîd, wêrek*“mêrxas, mêrxasan nas dikin” |
| **mêrxasî** | egîdî, wêrekî*“mêrxasî deh e, yek jê zor e û yên din fen in” |
| **mêrxwaz** | jina ku dilê wê bi guhneliyê heye |
| **mêş [I]** | 1. cureyekî heşeratên firinde ye 2. moza hingiv *“hespê piştkul, bîna mêşan ji dûr ve hildike” |
| **-mêş lê diterişe** | ewqas şimşat e ku mirov nikare xwe li serê bigire |
| **-mêşan çav derxistiye** | ewqas belengaz e ku nikare berde mêşan jî |
| **mêş [II]** | arasteka çekan |
| **-mêşa tivingê** | 1. nikilê ku bi serê lûleya wê ve ye 2. çapa lêxistina tivingê |
| **mêşereşk** | mêşa reş a nav malan |
| **mêşin** | mih *“deriyê kozê vebe, berx ber bi mêşinê û kar jî ber bi bizinê direve” |
| **mêşkuj** | alav an jî dermanê ku qira mêşan tîne |
| **mêşlok** | 1. bihuk 2. malbata bihukan |
| **mêtin/dimêj e/bimêje** | 1. hilçinandin, veçinandin2. dalêstin *“berxê jîr, du makan dimije” |
| **mêtingeh** | cihê ku terş û talanê wê tê kirin; zorxane |
| **mêtinker** | kêse ku xêr û bera welatekî bi neheqiyê dixwe; zordar |
| **mêtûlke** | rişk |

| | |
|---|---|
| **mêvan** | kesê ku li maleke biyanî bixwe, vexwe û binive; misafir *"gava mêvan tên, rizqê xwe jî bi xwe re tînin" |
| **mêvanî** | mêvandarî, misafirî*"here mêvaniya dijmin jî, lê çekên xwe ji bîr meke" |
| **mêvandarî** | kar, rêz, berhevî û xizmeta ku ji bo mêvanan tê nîşandan; misafirperwerî |
| **mêvanperwer** | kesê ku mêvanan baş mazûvanî dike; misafirperwer |
| **mêvanxane** | cihê hewandina mêvanan; misafirxane |
| **mêw** | dara tiriyê |
| **mêwe** | berên daran; fêkî |
| **mêwij** | 1. tiriyên hişkkirî2. qax |
| **mêxik** | qurnefîl |
| **mêze** | 1. awir, nêrîn 2. çêj 3. depekî rast ê ku li ser pêpikan qayîmkirî ye, li serê xwarin, nivîsandin û hwd tê kirin; mase |
| **mêze kirin** | meyzandin |
| **mêzer** | pûşiya serê jinan |
| **mêzîn** | alava giranîkêş |
| **micêrk** | 1. murîdê şêxekî2. miçewr |
| **micik** | di pêkanîna karekî de cidiyeta mirovî |
| **micwer** | rengê hêşîn ê tarî |
| **miçandin/dimiçîne/bimiçîne** | 1. (çav) damilandin2. (çav) qurçandin |
| **miçekçek** | çîçik, xeml, arastek |
| **miçekçekî** | çîçkirî, xemilandî, arastî |
| **miçewr** | xizmetkarê saziyên dînî |
| **miçêj** | mizêc, îştah |
| **miçilge** | 1. mijar, babet2. angaşt 3. merc |
| **-ketin miçilgeyê** | ketin mercê |
| **miçiqandin/dimiçiqîne/bimiçiqîne** | 1. (herka tiştê avî) asteng kirin 2. (tiştê avî) ji binî ve ziwa kirin |

| | |
|---|---|
| **miçiqîn/dimiçiqe/bimiçiqe** | 1. (herka tiştê avî) biriyan, asteng bûn 2. (tiştê avî) ji binî ve ziwa bûn *“kanî jî bêxwedî bimînê, dê bimiçiqe” |
| **miçirandin/dimiçirîne/ bimiçirîne** | 1. ji merhebetiyê re dest dirêjî yekî kirin 2. damilandin |
| **miç kirin** | (çav) girtin, damilandin |
| **miço** | zarokê biçûk |
| **midas** | sol, pêlav |
| **mifa** | sûd |
| **mifadar** | kêrhatî |
| **mifte [I]** | kilîl |
| **mifte [II]** | herwe, bêdirav |
| **miftexur** | herwexur |
| **mih** | peza mê, hevsera berên *“ne ji fesadan be, gur û mih dê bi hev re biçêrin” |
| **mij** | 1. moran, çem 2. dûyê ku dadikeve der û dorê*"sal mij e, kodik tij e" |
| **mijandin/dimijîne/bimijîne** | dan hilçinandin û vexwarin |
| **mijane** | di makîneyan de baskê ku giraniyê dikêşe; baskêş |
| **mijang** | bijang |
| **mijawî** | rewşa hewayê ya ku mijê her der rapêçaye |
| **mijîn/dimije/ bimije** | hilçinandin û vexwarin |
| **mijar** | babet |
| **mije** | tam û bêkêmasî |
| **mijok** | cureyekî çêreya zeliqok e |
| **mijûl** | kesê ku bi karekî re dibile |
| **mijûl bûn** | 1. pê bilîn 2. pê re eleqedar bûn |
| **mijûlî** | eleqedarî |
| **mikemik** | dengdana bizinan |
| **mikemik kirin** | (bizin) deng dan |
| **mikur** | 1. nas 2. aşkera |

| | |
|---|---|
| **mikur hatin** | kirina xwe eşkere kirin mil 1. endamê ji destan hetanî pîlan 2. alî |
| **-mil dan ber** | 1. qebûl kirin2. bi cih anîn |
| **-mil kirin** | rakirin û dan ser navmila xwe |
| **milç** | dengê devşepilandin û maçkirinê |
| **-milç çûn destan** | rahiştin destan û ramûsandin |
| **milçemilç** | 1. ji ber xwarinê û vexwarinê şelpeşelpa dêv 2. ji ber ramûsanê şelpeşelpa lêvan û cihê ramûsandî |
| **milçemilç kirin** | (dev) şepilandin |
| **milet** | gel, xelq *“here nav miletan, bigire jê adetan” |
| **milk** | 1. rastmala ji erd û avahiyan pêkhatî 2. hukimdarî*“ji milkan aş, ji hacetan simtiraş, ji mêran mêrê ku dike hesabê pêş û paş” |
| **milkiyet** | 1. hemû heyiyên kesekî 2. malê ku bi binecihî aîdî kesekî ye |
| **milpêç** | kinca gerdenparêz; kefî min awayê tewandî ê cînavka/ez/ê |
| -**min sîr nexwariye ku bêhn ji min bê** | min kirêtiyek nekiriye ku bê pêşiya min |
| **mindal** | zarok |
| **minet** | 1. sehm 2. tirs û xof *“hestiyê bê minet, çêtir e ji goştê bi minet” |
| **-mineta te li kaşê han!** | fermo çi di dilê te de derbas dibe bîne zimên! |
| **minho** | 1. riwayet 2. salix |
| **minminîk** | perperok, kerkene |
| **minminok** | kesê ku di kiryar û bizavên xwe de hêdî ye |
| **miqate** | 1. serwext 2. baldar |
| **miqate bûn** | 1. lê xwedî derketin 2. parastin |
| **miqawe** | cureyekî kaxeza stûr e |
| **miqilk** | 1. tawe 2. boçesêlîn mir qureyê mirûztirş |
| **-xwe mir kirin** | bi mirûztirşî xwe qure kirin |
| **mirar** | 1. sewala ku negihiştiye ber kêrê 2. miriyên ji sewalên ku goştên wan nayê xwarin |

| | |
|---|---|
| **miraz** | xwezî *“dilê bi xezeb, nagihêje tu mirazan” |
| **-miraz di çavan de man** | xweziya dilî bi ser tu armancê ve nebûn |
| **mirc** | kerane |
| **mirç** | milç |
| **mirçemirç** | milçemilç |
| **mirçemirç kirin** | milçemilç kirin |
| **mirdar** | 1. heram 2. qirêj û kirêt |
| **mirdal** | 1. mirdar 2. kesê bêqedr û çepel *“gotin ji mirdalan, sipî ji qerpalan” |
| **miremir** | dengê ku gotin jê nayê fehmkirin |
| **miremir kirin** | 1. (bi awayekî ku tê nayê gihiştin) axaftin 2. ginegin kirin3. (seg) girê xwe anîn |
| **mirêk** | awêne |
| **mirês** | îhtişam |
| **mirin [I]** | 1. candan 2. fewt 3. riya çûnehatê*“rê riya mirinê be jî, tu her li pêş be” |
| **mirin/dimire /bimire[II]** | 1. çûn ser dilovaniya xwe 2. ji giyaneweriyê veqetîn |
| **mirisandin/dimirisîne/bi mirisîne** | 1. perç lê daxistin 2. fors lê şikandin3. çivî lê sist kirin |
| **-guh lê mirisandin** | pir kutan |
| **mirisîn/dimirise/bimirise** | 1. bêmirês bûn 2. qirik lê miçiqîn û zibilîn |
| **mirî** | 1. candayî 2. bêgiyan*“miriyê di gorê de, jê nayê şermkirin” |
| **-mirî kenandin** | pir qerf û qeşmerî kirin |
| **mirîçok** | kesê sist, xav û lawaz |
| **mirîd/murîd** | tobedarê li ber destê şêx, xwedênas û çakan ê ku li ser riya wan herdem di xilwe û nizayan de ne |
| **mirîşk** | heywaneke bibask a kedîkirî ye *“beza mirîşkê, heta ber kadînê ye” |
| **-mirîşka kesî ji xewê ranekirin** | tu kes ji xwe nexeyidandin |

| | |
|---|---|
| **-keçêça mirîşkê** | kurika mirîşkê |
| **mirok** | her tiştê ku dawiya wî mirin e |
| **mirov** | însan *“çiyayê bêgul, wek mirovê bêdil e” |
| **mirovahî** | însanetî |
| **mirovatî** | mirovahî *“mirovatî germegerm, dijminatî nermenerm” |
| **mirovdost** | bihîstyarê erkên însanî |
| **mirovperwer** | însanperwer |
| **mirovxur** | kes û sewalê ku xwarina goştê mirovan rewa dibîne |
| **mirûç** | moçik |
| **mirûz** | 1. sikûm, sîma 2. gêwil |
| **mirûztirş** | 1. rûpirçî 2. bêgêwil *“hevalê xwarinê, her tim mirûztirş e” |
| **mis** | mîs |
| **misab** | alava ku solpêkirinê hêsan dike |
| **misas** | rim |
| **miselet** | qiraskê sêrî |
| **-miseletî serê yekî bûn** | bûn qîra reş û pê ve zeliqîn |
| **misêwa** | 1. daîmî 2. bi berdewamî; hemasa |
| **mishef** | navekî din î Qurana Pîroz e |
| **misîn** | derdana avê ya bilûlik |
| **misk** | bêhneke xweş e û ji qirguliya askê tê derxistin*“kûsî, miskê naxwe” |
| **-misk û enber** | du bêhnên xweşik in |
| **miskan** | kaniya ava madenî ya tahmsarkî |
| **misoger** | 1. bîmekirî 2. pêwist 3. îcbarî 4. kar an jî kiryara ku guman tê de tunebe; teqez |
| **misogerî** | pêwistî |
| **misoger bûn** | (gotin an jî kiryar) guman tê de neman û sed der sed hatin cihê baweriyê |
| **misoger kirin** | piştrast kirin, dabîn kirin |
| **mist** | 1. kulma mirovî ya miçandî 2. kefedest, felqedest |
| **-mist dan** | miz dan |
| **mistek** | gezo |

| | |
|---|---|
| **mişag [I]** | xortê çeleng î bikêrhatî |
| **mişag [I]** | kesê ku bi destheqekê dixebite |
| **mişar** | alava birînê; birek |
| **mişe [I]** | heqdest |
| **-mişeya kêmtirîn** | heqdesta hera hindik |
| **mişe [II]** | zêde, gelek |
| **-mişe bûn** | zêde bûn |
| **mişefil** | hendef |
| **mişepere** | riba |
| **mişexur** | kedxur |
| **mişext** | 1. firar 2. penaber3. revok |
| **Mişexte** | tarawgeh |
| **Mişextî** | penaberî |
| **mişext kirin** | 1. koçber kirin 2. şandin tarawgehê |
| **Mişeyî** | hebûn û lawanî |
| **Mişk** | cureyekî ajalên ziyandar e *“mişk çiqasî axê bikole, bi serê xwe de dike” |
| **-derê ku mişkan jî mala wî terikandine** | êdî tût û rût maye û kes pê nasitire |
| **Mişkane** | barimte, gerew |
| **Mişmiş** | arûng, zerdelî |
| **Mişmişî** | rengê arûngê |
| **Mişt** | tijî *“ji yê kor re gotine: tu çi dixwazî?; gotiye dinyayeke mişt ronî” |
| **-mişt û dagirtî** | tijî û qûç |
| **-mişt kirin** | heta dêv dagirtin, heta dêv tijî û qûç kirin |
| **Miştax** | tiştê di heman rêzê de |
| **Miştaxe** | bêndera hişkirina tiriyan |
| **-bûn miştaxe** | li her derê pir zêde bûn |
| **Miştaxan** | werza hişk-kirina tirihan |

| | |
|---|---|
| **miştin/dimiş e/bimişe** | maliştin |
| **Mişûr** | 1. zehmet 2. zûrî |
| **-mişûr xwarin** | 1. zehmet kêşan 2. zûrî dîtin |
| **mit [I]** | çiqilên biçûk |
| **mit [II]** | 1. bêpêjn 2. bêdeng 3. kesê ku nabihîze |
| **-mit man** | mehtel man, bêpêjn man |
| **mitale kirin** | (li ser babetekê) ponijîn |
| **mit bûn** | bêtevger di cih de sekinîn |
| **-mitbûna zivistanê** | tevza ku dikeve cendekê hin ajalan û zivistanê di xewê de dimînin |
| **Mitêl** | lihêf |
| **Mitî** | bêdengî |
| **mit kirin** | xwe ker kirin(dengê xwe nekirin) |
| **Mitmayî** | mehtel, bêpêjn |
| **Mitrib** | 1. stranbêjê dawetan2. qereçî *“mitriban gotiye: ‘ji ufara bênderan nebûya, me dê jî cotkarî bikira’” |
| **Mitribî** | 1. stranbêjiya dawetan2. qereçîtî *“hebe erebî ye, tunebe mitribî ye” |
| **Mix** | bizmar |
| **-mix kirin** | bizmar kirin |
| **Mixabin** | cihê daxê ye ku |
| **Mixmaz** | qemçik |
| **Mixrik** | hevrik, reqîb |
| **Miyaw** | dengê pisîkan |
| **miz [I]** | mişe |
| **miz [II]** | tahmxweş (tahma tirş û şirîn têkilhev) |
| **miz dan** | dest ser gerandin û tev li hev dan |
| **Mize** | xwarinên sivik ên meyxuran ên ku digel meyê dixwin |
| **Mizemiz** | devgerî |
| **mizemiz kirin** | 1. gotin di devê xwe de birin û anîn2. rastî veşartin |
| **Mizgetf** | 1. camî 2. mescîd *“heke xêr li malê here, ne hewceyî mizgeftê ye” |
| **Mizgîn** | xeber û bûyera kêfxweşî û dilgeşiyê |

| | |
|---|---|
| **Mizgîndan** | agahdarkirina bi xeber û rûdaneke kêfxweşiyê |
| **Mizûr** | karmendê gumrikê |
| **Mî** | mih *"miya xerîb, li rexê keriyî mexel tê" |
| **Mîheng** | eyer |
| **-mîheng dan** | eyer kirin |
| **Mîhrîcan** | 1. cejna havînê2. bernameya pêşangeh û civînên komelî 3. (di kurdiya kevn de) roja ku mirî ji nû ve candar dibin, roja qiyametê |
| **Mîhrîgan** | payîz |
| **Mîhrîvan** | bexşende |
| **Mîl** | mendirêjahiya cîhanî ya ku pê maweya di navbera du xalên erdnîgarî de tê pîvan |
| **Mîjo** | têjika ku çi guhan têkeve ber dimije |
| **Mîmar** | endazyar |
| **Mîmarî** | endazyarî |
| **mîna [I]** | wekî, notla, fena*"bixwe mîna mêran, rabe mîna şêran" |
| **mîna [II]** | xuya |
| **-mîna bûn** | xuya bûn |
| **Mînak** | 1. nimûne 2. wekok |
| **-wekî mînak** | ji bo nimûnetiyê |
| **mînandin/di mînîne/bimî nîne** | çend tişt anîn astekê û hemû wekî hev kirin |
| **Mîntan** | 1. kiras 2. qutik |
| **Mîr** | 1. kesê rêveberiya deverekê dike û li payetextî rûdine; emîr 2. serokê êlekê 3. key *"mîr jî dimire, evdal jî dimire" |
| **Mîrala** | 1. serheng 2. fermandarê herêmekê |
| **Mîran** | Bircê Mêzînê |
| **Mîrate** | kelepor, mîras |
| **Mîrav** | berdestî û pêgirtiyên mîrekî |
| **Mîrek** | serek |
| **Mîrekî** | pergala rêvebiriyê ya ku di destê mîrekî de ye |
| **Mîrgeh** | dever an jî welatê ku rêvebiriya wê mîrnişînî ye |
| **Mîrî** | dezgeh, kar, mal, erd û hwd yên ku girêdayî mîrgehê ne |

| | |
|---|---|
| **Mîrkut** | mêkut, çakutê mezin î darînî *“li deriyê kesî mexe bi tiliyan, bila kes li deriyê te nexe bi mîrkutan” |
| **Mîrlîwa** | mîrala |
| **Mîrnişîn** | mîrek |
| **Mîrnişînî** | 1. emîrtî 2. serokatiya êlekê 3. keyanî |
| **Mîro** | mûrî, gêrik *“ecelê mîroyî tê, çeng pê ve hêşîn dibin” |
| **Mîrza** | 1. kurê mîr 2. esîlza, torin |
| **Mîs** | madenê ku jimareya wî ya atomî 29, giraniya atoma wî 8.95, kurteya wî ya latînî Cu ye û di1084 dereceyan de jî dihele |
| **Mîsger** | pîşekarê alavên mîsîn |
| **Mîsgerî** | pîşekariya alavên mîsîn |
| **Mîsîn** | alav û amanên ku ji mîsê hatine çêkirin |
| **Mîstanik** | cureyekî nexweşiya çêrmî e |
| **Mîstanikî** | endamê şeliqî |
| **mîstin/dimîze/bimîze** | mîz kirin *"adarê kêrguh sibehan xwîn dimîze, nîvro xwe davêje ber siya darê” |
| **Mîweganan** | Kelûya şêrî(21’ê Tîrmehê-20’ê Gelawêjê) |
| **Mîz** | aviya ku ji mîzildankê derdikeve *“mîza mişkî, ji êş re kar e” |
| **-mîza wan ne zelal e** | hin xiniziyên wan ên veşartî hene û lewre teletel/tirsetirs digerin |
| **Mîzdank** | mîzildank |
| **Mîzildank** | di lêş de endamê ku aviyên bêkêr dicivîne hev û bi riya endamê zayendî valayî derve dike |
| **Mîzkêş** | lûleya ku mîzê veder dike |
| **mîz kirin** | aviya mîzildankê berdan derve |
| **Mîzok** | kesê ku nikare mîza xwe bigire û di bin xwe de berdide; kelemîzokî |
| **mîztin/dimîze/bimîze** | mîz kirin |
| **Moçe** | hêstira mê; meya |
| **Modine** | çapa lûleya tifingê |
| **Mohr** | alavake biçûk a ku nav û navnîşana mirovî an jî cihê karê mirovî tê de kolayî ye û li şûna şanenavan li kaxezan tê xistin û wekî nîşaneya fermîtiyê tê pejirandin*“zor dizane û zêr dizane, devê tivinga bi mohr dizane” |
| **mohr kirin** | 1. nîşaneya fermîtiyê lê dan 2. çespandin3. karê qedexe betilandin |

| | |
|---|---|
| **Mole** | bûjena ku pê tê seyandin |
| **Mon** | mirûztirş, pirçî |
| **Mor** | mohr |
| **Moran** | ewrê tîr ê ku dadikeve rûyê erdê û bînayî tê de kêm dibe; mij |
| **Morî** | xemla hebhebî ya ku ji şûşeyê hatiye çêkirin, jin di stû, zend û laçikên xwe ve dikin*“moriya biqul, di xurcikê etaran de namîne” |
| **-morî winda kirin** | li tiştekî pir biçûk gerîn |
| **mostik** | derdanka ku tê de av, şîr û hwd didine zarokên viringî |
| **moşek** | cureyekî teqemeniyên giran e |
| **movik** | herewera ku hesti yan bi hev ve dizeliqîne; mefsel, mok |
| **mox** | mêjî |
| **moxil** | cureyekî bêjingên ku hûr lê dike |
| **moz [I]** | cureyekî mêşan e |
| **moz [II]** | golika dusalî |
| **mozbeş** | kermêş, zerqîtik |
| **mozik** | 1. moza biçûk 2. golika dusalî *“heke ga bike û bi tenê bixwe, lê mozikê tolik dê çi bixwe?” |
| **moz kirin/dan mozan** | 1. ji ber mêşan lotik dan2. engirîn û silikîn |
| **mozqirtik** | mozbeş |
| **mozrîk** | çîkên ku ji êgir difirin |
| **mucahid** | kesê ku di riya Xwedê de derketiye cengê |
| **muflan** | pezkovî |
| **muflis** | malketî, îflaskirî |
| **muhacir** | koçber |
| **muhacirî** | koçberî *”pêncî salî mihacirî, ne bi salekê neyarî” |
| **mujikî** | 1. teral 2. qirêj |
| **mukur hatin** | 1. rik hatin2. nepejirandin *“dizên bîstanan, mukur tên zivistanan” |
| **munasib** | 1. guncan 2. layîq3. hevaheng 4. lihevhatî*“Xwedê sêrî dibîne, kumê munasib lê datîne” |
| **murîd** | pêgirtiyê şêxekî*“murîdê ku bi sirekê were û tirekê here, ew tu ne murîd e” |

| | |
|---|---|
| **musteqbel** | ayende, pêşeroj, dahatû |
| **mustesna** | tiştê derî mijarekê; awarte |
| **mux** | zanayê zerduştiyan |
| **muxalif** | dijber |
| **muxbêd** | mux |
| **muxtar** | keya |
| **mû** | pirç *"keda helal dibe mû lê naqete, keda heram bibe weris jî diqete" |
| **-mû jê şaş nekiriye** | her du jî di lisfê hev de ne |
| **-mûyê xwe bi ciwanan re qusandin** | li salên temenê xwe nenihêrîn û bi ber bayê xortan ketin |
| **mûç** | guhvîtkirina sewalan |
| **-mûç kirin** | (sewal) guhê xwe vît kirin |
| **mûçe** | meaş, mehanî |
| **mûçilk** | alava ku pirça bêkêr pê tê rûçikandin |
| **mûçing** | mûçilk |
| **mûd** | kîn |
| **mûdî** | 1. ezaker 2. kîndar |
| **mûle** | herî |
| **mûm** | keresteyeke ronîkirinê ya ku ji şima û bezî tê çêkirin û pilteyek di navê de ye; find |
| **mûmdank** | derdana ku mûmê tê de datînin; findank |
| **mûmar** | kurmê doranan |
| **mûnandin/dimûnîne/bimûnîne** | hûnandin |
| **mûnîn/dimûne/bimûne** | hûnîn |
| **mûr** | bêdengê rûtirş |
| **mûrî** | mûstang, gêrik |
| **mûrîstan** | hêlîna gêrikan |
| **mûsîqa** | newanasî |
| **mûsîqanas** | newanas |

| | |
|---|---|
| **mûsîqajen** | pisporê newayan |
| **mûşek** | mêvanê ku bêyî vexwendina xwediyan tê |
| **mûtaw** | bend û werisê mûyîn |
| **mûyîn [I]** | 1. bipirç, bipûrt2. ji pirç û pûrtê *“bila dil bi dil be, bila kirasê mûyîn li mil be” |
| **mûyîn/dimûne/bimûne[II]** | mûnîn |
| **mûz** | fêkiyeke qalikzer û dûvedirêjkî ya ku li erdên germ şîn dibe |
| **mûzî** | endamê zayendî yê nêrzayan; kîr |

# N

| | |
|---|---|
| **n/N** | tîpa hevdehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê diranî ye û awayê belavbûna wê girtî û difinî ye |
| **na** | 1. bersiva neyiniyê, dijbera erêniyê 2. carinan wekî pêşgirekê tê û wateya neyîniyê dide*“giliyê mêran yek e, ya erê ya ‘na’ ” |
| **nabe ku** | (di zagonsaziya leşkerî de) qedexe (wek: nabe ku çekên agirber bêsedem bên teqandin!) |
| **nabînk** | cureyekî kerdenekan e |
| **naçar** | neçar |
| **naçarî** | neçarî |
| **nadan** | nemerd |
| **nadir** | tiştê ku kêm caran tê dîtin; degme |
| **nag** | hêştira mê |
| **Nahid** | gerestêrkek e |
| **nakok** | 1. zid 2. muxalif, dij |
| **nakokî** | 1. tezad 2. muxalefet, dijayetî |
| **nal** | hesinê ku li binê simê ker û hespan dixin |
| **-nal kirin** | 1. nal bi simên sewalan ve mix kirin 2. nal ji binê simê vexistin*“hêştir nal dikirin, rovî çû û got: ‘pe pe” |
| **nalan** | zarîn |
| **nalandin/dinalîne/binalîne** | 1. zarezar pê xistin 2. êşandin û wêlewêl pê xistin |
| **nalbend** | pîşekarê nalkirinê; simtiraş *“nalbendê baş, mîroyan jî nal dike” |
| **nalbir** | firoşkarê alavên avasaziyê |
| **nalbirxane** | firoşgeha alavên avasaziyê |
| **nalebar** | 1. dij 2. berhember |
| **nalenal** | 1. zarezar, zûrezûr2. wêlewêl, kûzekûz, nûzenûz |
| **nalenal kirin** | 1. zarezar kirin 2. nûzenûz kirin |
| **nalik** | şimikên ku binê wan darîn e |
| **nalîk** | nîvîna stûr a ku li serê tê razan; bincî, binrex |

| | |
|---|---|
| **nalîn/dinale/ binale** | 1. zarîn, zûrîn 2. axîn, kû zîn, kûrîn, nûzîn |
| **name [I]** | peyama nivîskî ya ku ji yekî re tê şandin; reşbelek |
| **-name [II]** | paşgireke ku di navdêre ve dizeliqe û wateya kaxeza niviskî didê |
| **namedor** | biryara ku piştî civînekê hatiye wergirtin; giştîname |
| **namerd** | nemerd |
| **namilke** | 1. daxuyanî 2. danezan |
| **namûs** | 1. ifet 2. tiştê herî pîroz ê li cem mirovî wek welat, ax, jin, zarok û hwd; rûmet *“namûs avêtine ber kû çikî, wî jî nexwariye” |
| **-namûs peymal kirin** | bi zorê ifet û rûmeta yekî şikandin |
| **namzed** | navzed |
| **nan** | 1. xwarineke sereke ya ku ji hevîrê arê genimî û li ser sêla sincirî an jî di tenûrê de tê birajtin, gelek cureyê wî hene 2. îkram *“av, şûna nên nagire” |
| **-nanê tisî bi dêst neketin** | pir xizan bûn |
| **nan dan** | 1. xwarin dan 2. aş dan |
| **nandar** | 1. mazûvan 2. mêvanperwer *“meriv bi nanekî nandar, bi çoyekî mêrxas nabe” |
| **nandank** | teşt an jî derdanka ku nên dikine navê *“nankor nên dixwe, nandankê jî didirîne” |
| **nandayî** | 1. comerd 2. mêvanperwer *“nandayî, birçî namînin” |
| **nanfiroş** | xwediyê firinê an jî firoşkarê nên |
| **nangir** | erdê bi xêr û ber |
| **nangiranî** | xela |
| **nanik** | cureyekî bîşiyan e |
| **nankor** | 1. xayîn 2. kesê ku qencî û çakiyê zû ji bîr dike; neşêkirandî |
| **nankorî** | 1. xayîntî 2. bêspasî |
| **nankorî kirin** | 1. xayîntî kirin 2. neşêkirandin |
| **nano** | kesê ku tatêla wî her xwarin û vexwarin e |
| **nanoziko** | 1. ne têr ne birçî 2. xebata ku tenê bi kêrî ziktêriyê tê |
| **nanpêj** | 1. kesê ku nên dipêje 2. aşpêj |
| **naqos** | 1. zengil 2. zengilê dêrê yî ku wextê ayîna filehan diyar dike |

| | |
|---|---|
| **-barûya naqosê** | birca ku zengilê dêrê tê de tê daliqandin |
| **nargîle** | kokos |
| **narinc** | malbata mêweyên wekî leymûn, porteqal û hwd |
| **narincî** | rengê porteqalê |
| **narincok** | cureyekî teqemeniyên ku bi dest tê avêtin |
| **narîn** | 1. nazik û tenik 2. nerm |
| **narvîn** | qeder, çarenûs |
| **nas** | heval û hogirên ku ji dûr û nêzîk ve bi hev re têkiliyên wan hene *“mirov, bi nasan digihê xasan” |
| **nasandin/dinasîne/binasîne** | agehî dan, xeberdar kirin |
| **nasirge** | ereboka destan a ku pê barên biçûk dikêşin cihekî |
| **nasîn/dinase/binase** | 1. zanîn 2. hay jê hebûn3. pê hesîn |
| **nas kirin** | 1. zanîn 2. pê beled bûn 3. aşina bûn *“hesp, siwarê xwe nas dike” |
| **nasname** | kaxeza ku daneyên di heqê yekî/yekê de dide |
| **nasyar** | 1. dost, hogir 2. hevalbend |
| **nasyarî** | 1. dostanî, hogirî2. hevalbendî |
| **naşor** | parçeyek ji rîsê zirav; nex |
| **naşte** | 1. birçîtî 2. xela |
| **-naşteya li ser naşteyê** | birsa pey birsê |
| **naştin/dinêje/binêje** | 1. çal kirin 2. veşartin 3. mirî kirin gorê |
| **nator** | nobedarê bêx; zêrevan |
| **natorî** | çavdêrî, zêrevanî |
| **nav [I]** | 1. mawe 2. ferqiyet |
| **-di vê navê de** | di vê maweyê de |
| **nav [II]** | hundir *“di nava salekê de du havîn nabin” |
| **-di nav xêrê de** | bî xêra Xwedê li ser te be |

| | |
|---|---|
| **-di nav xwîna sor de gewixîn** | birîneke xedar girtin û pir xwîn jê çûn |
| **nav [III]** | agehiya ku tiştek pê tê nasîn û zanîn*“navê wê Edlan e, ji mêrê xwe re nezan e, ji xelqê re kebaniya bîst û heft malan e” |
| **-nav hildan** | 1. bi bîr anîn2. bi dengekî bilind gazî yekî kirin 3. navê kesê mirî li yekî kirin |
| **-nav lê kirin** | pênasek lê danîn da ku pê bê nasîn |
| **-nav nivîsandin** | ji bo egereke rêvebiriyê navê xwe qeyd kirin |
| **-nav tê dan** | 1. teşwîq kirin2. niçandin |
| **nav [IV] û nûçik** | 1. pênasên ku nirxê yekî/tiştekî dadixîne 2. leqebên soxkirinê |
| **-nav û nûçik lê kirin** | jê re navên soxkirinê peyde kirin |
| **nav [V] û nîşan** | salix û wesfên kes an jî tiştekî; dilq |
| **-nav û nîşan dan** | 1. zanîn û agahiyên der heqê yekî de eşkere kirin 2. îxbar kirin |
| **navbend** | navber |
| **navbendî** | dûrî an jî dirêjiya di navbera cihan de |
| **navber** | 1. mawe, mesafe2. ferqiyet *“di navbera şûrkişandin û lêxistinê de pir zeman heye” |
| **navberkar** | 1. navbeynkar, kesê ku du kes an jî du koman bi hev tîne 2. kesê ku nahêle du kes an jî du kom tûşî hev bên |
| **navberkarî** | 1. navbeynkarî, lihevanîna du kes an jî du koman 2. astengkirina aloziya di navbera du kes an jî du koman de |
| **navbernav** | sernava ku di navbeyna du mijarên cihê de tê danîn |
| **navbir** | 1. tixûbê di navberê de 2. bêhinvedana kurt a di nava dema karî de |
| **navborî** | 1. navê ku bihuriye; navhatî 2. agahiya ku xulekek berê çêlî wê hatiye kirin |
| **navçav** | 1. navbera her du çavan 2. enî |
| **navçe** | bajarokê bi ser bajarekî mezin ve |
| **navçeng** | binçeng |
| **Navçêmk** | Mezra Botan |
| **navdank** | 1. navê ku pê hatiye nasîn; kunye 2. paşnavê ku pê hatiye nasîn; leqeb |
| **navdar** | bi nav û deng; meşhûr |

| | |
|---|---|
| **navdest** | kesê ji rêzê |
| **navdêr** | (r) navê heyberan |
| **navend** | cihê ku kar û çalakiyên ramyarî, civakî, çandî û hunerî lê tên birêxistin; merkez |
| **-navenda nûçeyan** | merkeza xeberan |
| **navendî** | merkezî |
| **naverast** | ne li çepê ne jî li rastê tam di çatê de |
| **naverok** | muhtewa, têxistî |
| **navêş** | zikêş, hinavêş |
| **navgir** | qertafa ku dikeve navbera du peyvan wek: reşeba, seranser, danûstandin... |
| **navgîn** | 1. amûr, alav 2. alavên raguhastinê ên bejî, avî û hewayî; wasite |
| **-navgina siyasî** | melzemeyê siyasetê |
| **-navgînên ragihandinê** | alavên agehdariya girseyî |
| **navik** | doraneke ku di derveyê zikê zarok û hinek têjikan ve ye, di pizdankê de bi riya wê xwarinê werdigirin û piştî bûyînê tê qutkirin, lê dewsa wê wekî kortikekê dimîne |
| **navîn** | tiştê ku di navberê de ye |
| **-rojhilata navîn** | erdnîgariya ku Quds û doraliyên wê nîşan dide |
| **navkêlk** | newq |
| **navko** | navenda malê |
| **navlêk** | 1. şayeseya kirûyekî2. navdank |
| **navmal** | nava malê; navko |
| **navmalî** | 1. jina ku di kar û barên malê de alîkariyê dide xwediyan 2. kelûpel û pêdivîyên nav malê (yên wekî: nivîn, aman, text û hwd) |
| **navmil** | cihê ku (ji aliyê pişta mirovî ve) dikeve navbera her du milan; serpîl |
| **navneteweyî** | tiştê ku di nava hemû gelan de tê naskirin; navmiletî, beynemilel |
| **navnêrî** | di çêreyê de beşa ku bejn davêje û tov digire |
| **navnîşan** | agahiya ku cih û warê tiştekî nîşan dide |
| **navno** | bi çêyî an jî neçêyî derketina navê kesekî*“navê gur, navno derketiye, roviyî dinya qelandiye” |
| **navpişt** | ji serpîlan hetanî kovika qûnê |

| | |
|---|---|
| **navok** | navik *“nav hebe, navok tuneye” |
| **navran** | 1. şeqa kincan 2. navbera her du ranan/ lingan |
| **navrêz** | di nivîsanê de maweya di navbera rêzan de |
| **navroj** | 1. nîvro 2. xwarina danê nîvro, firavîn |
| **navsale** | kesê ku di temenê navîn de ye/40-50 salî ye |
| **navser** | ger û rastahiya li serê bilindahiyekê; serger |
| **navsere** | navsale |
| **navteng** | 1. newq 2. qûşa zînê hespan |
| **navşalik** | navran |
| **navxweyî** | hundirîn |
| **navzed** | berbijar, berendam |
| **navzik** | (ji aliyê hundir ve) cihê ku endamên hundirîn ên wekî hûr, doran û hwd tê de ne |
| **nawis** | 1. binanî 2. mexzena kel û melan |
| **naxêr** | 1. na 2. wisa nabe |
| **naxir** | keriyê dewêr |
| **nayîn/dine/bine** | 1. gayîn2. tecawuz kirin, hiltirandin*“ne bine dînan, ne jî qûna xwe bide wan” |
| **naz** | cilwe, delalî *“naz, taca jinan e” |
| **nazdar** | cilwedar, delalik |
| **nazik** | 1. kibar, kaw 2. tenik |
| **nazik bûn** | 1. kibar bûn 2. diltenik bûn |
| **naziktî** | 1. zerafet, kawî, kibarî 2. diltenikî |
| **naznazok** | cureyekî gulên ku li ber tavê diçilmisin û di hênikahiyê jî de geş dibin |
| **ne** | qertafa neyîniyê |
| **ne ... ne** | qertafa neyîniyê ya dualî *“ne bi bezê ne bi lezê kes nagihêje mirazê” |
| **neasayî** | 1. awarte 2. dererê3. derehiş |
| **nebaş** | 1. neçê, nerind 2. qûnek |
| **nebaşî** | 1. nerindî 2. qûndetî*“ne dijminê nebaşan be, dijminê nebaşiyê be” |
| **neban** | 1. sewala ku nahêle berxa wê bimije 2. tor, hîn-nebûyî 3. axozî 4. havî |
| **nebanî** | 1. torî û ecemîtî2. axozîtî 3. havîtî |
| **nebat** | hêşinahiya ku li ser rûyê erdê ye; xerat |

| | |
|---|---|
| **nebez** | azad |
| **nebîna** | kor, nedîtî *"mêr mêr e çi kulek, çi nebîna, çi ker e" |
| **nebîrbir** | koreçemk |
| **nebû** | îftira |
| **necar** | kesê ku daran dadiroje û jê alavên malê çêdike; xerat |
| **necirandin/dinecirîne/binecirîne** | darotin |
| **neçar** | 1. bêgav 2. bêderman |
| **neçarî** | 1. bêdermanî, bêgumanî2. belengazî, bêgavî |
| **neçê** | nebaş, neqenc |
| **nediyar** | 1. mechûl, nekifş2. neaşkera |
| **nedîtek/nedîtî** | 1. laylac2. çavbirçî *"nedîtiyan dîtin, di xwe de rîtin" |
| **nedîtbar** | razber |
| **nefel** | sêbelg, keta mêrgan |
| **nefer** | kes |
| **-jûra yekneferî** | odeya ji bo kesekî tenê |
| **neferma** | medenî |
| **-saziyên civaka neferma** | mueseseyên civaka medenî(ên serbixwe) |
| **nefilandin/dinefilîne/binefilîne** | 1. avêtin 2. ji ser hişê xwe avêtin |
| **nefî** | koçberî, qewar, tarawgeh |
| **nefî bûn** | 1. koçber bûn 2. hatin qewirandin 3. çûn tarawgehê |
| **nefî kirin** | 1. koçber kirin2. qewirandin 3. şandin tarawgehê |
| **nefret** | heznekirina tiştekî |
| **-jê nefret kirin** | ji tiştekî hez nekirin |
| **nefs** | 1. kesayet 2. silektî, çilektî *"ji bo nefsê, kete hebsê" |
| **nefsbiçûk** | 1. dilnizm, mutewazî 2. awirşikestî |

| | |
|---|---|
| **nefsek** | silek, çilek |
| **neft** | aviya ku ji binê erdê tê derxistin, jê ardûyên navgînan û alavên curecureyî tên çekirin; zêrê reş |
| **-nefta xam** | nefta ku hê jî nehatiye veqetandin |
| **neftî** | şînê tarî |
| **nege** | îftira |
| **negotî** | 1. dernebirî 2. neaxiftî |
| **neguhêzbar** | tiştê ku ji cihê wî nayê neqilkirin; dorpêçkirî |
| **neh** | 1. hejmara beriya dehan û piştî heştan 2. jimareya9'an *"neh qencî, tuxtek tirs" |
| **nehberk** | lîstikeke ku bi neh keviran tê lîstin |
| **nehek** | 1. ji neh paran parek2. neh rojên beriya eyda qurbanê 3. rojiya di van rojan de |
| **nehem(-în)** | di rêza nehan de |
| **neheng [I]** | 1. egîd 2. dêw, ûc |
| **neheng [II]** | cureyekî masiyên girs û biguhan e |
| **neheq** | 1. bêheq 2. ji rastiyê der 3. bêdad *"neheq, lê dikeve tîra Heq" |
| **neheqî** | 1. zilm 2. derî rastiyê 2. bêdadî *"neheqiya vî destî, ji ya vî destî re namîne" |
| **neheqî lê kirin** | 1. mafê wî desteser kirin 2. heqê wî pêpest kirin |
| **nehên** | 1. nepen 2. derzagon |
| **nehênî** | 1. nepenî, nediyarî2. derzagonî, derî qanûnan |
| **nehişî** | 1. jixweveçûyî 2. benckirî 3. dîn |
| **nehişî bûn** | 1. ji xwe ve çûn 2. tevizîn 3. dîn bûn |
| **nehmandin/ dinehmîne/binehmîne** | li pêşberî yekî tiştek xwarin û jê nedan wî |
| **nehs** | 1. kone 2. şûm 3. qeşmer |
| **nehs bûn** | 1. kone bûn 2. şûm bûn 3. qeşmer bûn |
| **nehsî** | 1. konetî 2. şûmtî3. qeşmerî |
| **nehs kirin** | 1. rû dan 2. şûm hîn kirin |
| **nehşem** | roja ku dê tu carî neyê |
| **-îro here û nehşemê were** | niha here û hêviya xwe ji vî karî yekcar bibire |

| | |
|---|---|
| **nehwirandin /dinehwirîne / binehwirîne** | 1. miremir kirin 2. bildebild kirin |
| **nekelî** | nepijî |
| **neker/nekir** | 1. kesê ku ji xwe re tu karî nake; noker2. teral *"nekero/nekiro dilkesero, kerewo/ kiriyo xwerewo/xweriyo” |
| **nekes** | bêkesayet |
| **neks** | 1. hilm û nefes 2. parxan |
| **-neks çikîn** | bêhn çikîn |
| **nelê** | 1. netêw, netê, hew2. lênehatî |
| **nema** | 1. qet, qe 2. ji wir bi şun de, êdî |
| **-nema dikare** | ji vir şun de nikare, hew dikare |
| **nemam** | 1. çiqilên daran ên ku ji bo çandinê hatine amadekirin 2. şivikên darîn ku dê bibine dar; şitil |
| **neman** | 1. helak bûn 2. têk çûn 3. çûn hatenehatê |
| **nemaze** | bi taybetî, xasma |
| **nemerd** | 1. bêbext 2. necamêr |
| **nemêr** | 1. şindokê mêran2. mêrê ku endamê wî yê zayendî bi karê xwe ranabe; tirxes *“ê ku got û kir mêr e, ê ku got û nekir nemêr e, ê ku negot û kir şêr e” |
| **nemir** | 1. mirovê ku xizmeteke mezin dike, navdar dibe û her çiqas dimire jî navê wî her sax li ser zimanê xelqê dimîne2. hetahetayê, ebedî 3. bêpayan |
| **nemrût** | kirêt |
| **nemrûtî** | kirêtî |
| **nenas** | 1. nezan, nebeled2. kes yan tiştê ku mirovî berî niha nedîtiye; mechûl, biyan *“her cihê nenas, payê xwe bide xas xas” |
| **nenîk** | hestiyê nermik ê ku bi serê pêçiyan ve hêşîn dibe û piştî ku dirêj dibe tê birîn |
| **nenîkbir** | alava ku pê nenîk tên qutkirin |
| **nenok** | jina ku zarokan nayine |
| **nepak** | 1. neçê 2. qirêjok |
| **nepax** | tifika hesinkeran |
| **nepayîdarî** | neberdewamî |
| **nepen** | 1. veşartî 2. nehên3. nexuya |
| **nepenî** | 1. xwedî-raz 2. nehênî *"berf di nepeniyan de, pere ba pintiyan dimîne” |

| | |
|---|---|
| **nepêt** | 1. bêsinc û bêtaqet2. bêçîn û gawestî |
| **nepijî** | xav, kal |
| **nepixandin/ dinepixîne/ binepixîne** | 1. perçifandin2. pif lê kirin 3. ba dan ber |
| **nepixîn/dine pixe/binepix e**1 | . ba hatin ber 2. perçifîn |
| **nepox** | 1. tiştê ku pif dane ber û perçifiye 2. pêlîstoka zarokan a ku ba dane ber |
| **neqandin/di neqîne/bine qîne** | 1. hilbijartin 2. ji nav re girtin |
| **neqeb** | 1. navbera du tiştan2. qul, kun |
| **neql** | 1. raguhastin 2. car, teql |
| **neqliyat** | karê raguhastina baran (bejî, deryayî, hewayî) |
| **neql kirin** | derbasî cihekî din kirin; raguhastin |
| **neqş** | 1. raçandin 2. moçik*"gotinên pêşiyan, wek neqşên li ser keviran e" |
| **-neqş û nîgar** | moçik û resm |
| **neran** | dara tizbiyan |
| **nerasterê** | neyeksere |
| **nerd** | cureyekî lîstikên qimarê ye |
| **nerde** | astengên hesinî yên li dora pêlekan û şanişînan |
| **nerdigan** | pêlekan nerît tetbîq |
| **nerîtandin/di neritîne/ bineritîne** | tetbîq kirin nerîtî tetbîqî |
| **nerm** | 1. nehişk, ter 2. nezivir*"bitirse ji germa germ û mirovê nerm" |
| **nermahî** | 1. nehişkî, terîtî2. nezivirî, xavî |
| **nerme** | tiştê ku bûjenên sext û zivir tê de tune ne |
| **nermegoşt** | goştê bêhestî |
| **nermehur** | hevrazê ku lê kevir û kuçik tunene |
| **nermekuxik** | kuxika asayî ya ku mirov jê aziyê nake |
| **nermenerm** | 1. wexta ku hîn nerm e 2. bi awayekî ku kes nebîne û nebihîze*"hêsin dikutin germegerm, mêran dikutin nermenerm" |

| | |
|---|---|
| **nermijandin/ dinermijîne/ binermijîne** | bi mizdanê nerm kirin |
| **nermijîn/din ermije/biner mije** | (tiştek) bi mizdanê nerm bûn |
| **nermik** | 1. nezivir û bêgirnoz2. rehet û aramdar |
| **-nermika guh** | goştê nerme yê li guçê jêrîn î guhî |
| **nermî** | 1. nermahî 2. musamehe3. vehelîn *“bi nermî, mar ji qulê tê der” |
| **nermînka** | hêdîka |
| **nerm kirin** | 1. rehn kirin2. hişkî jê birin 3. aliyê zivir jê birin *“peyva xweş, keviran nerm dike” |
| **nermofis** | nermok |
| **nermok** | 1. bêkêr 2. bêxêr*“ji pêl û pêlekan metirse, ji nerm û nermokan bitirse” |
| **nesax** | nexweş |
| **neseb** | silale û esl |
| **nesîb** | qismet *“nesîb çi be, ew e” |
| **nesrîn** | gula biyanî |
| **nestêle** | 1. zarok 2. xort3. kesê girîng |
| **neşmî** | kesê ku pûte bi her karî dide; bihîstyar |
| **neşmîtî** | bihîstyariya hemberî her tiştî |
| **neşter** | kêrika bijîjkiyê ya tenik û pir tûj |
| **neşterger** | bijîjkê ku pisporiya wî derz, şkestek û endamê leqiyayî ye |
| **neştergerî** | karê ku neşterger pê radibe |
| **neşterxane** | di nexweşxaneyan de jûra ku neşterger tê de emeliyatan dike dikin |
| **neşûştî** | gorgorê gorgor; melûn |
| **net** | 1. çune, sifir, (0) 2. betalbûyî, derehesab |
| **-net kirin** | 1. sifir kirin, fît kirin 2. betal hesibandin, ji hesaban derxistin |
| **netê** | 1. hêç 2. netêw |
| **netêw** | 1. nelê, tuneyî 2. betalbûyî |
| **netewe** | 1. gel, milet 2. xelq |
| **neteweyî** | têkildarî neteweyekî; miletî |

| | |
|---|---|
| **neteweperes t** | kesê ku harê neteweya xwe û hovîtiya dijî neteweyên din rewa dibîne |
| **neteweperw er** | gelperwer |
| **netîce** | 1. akam, encam 2. dawî, aqibet |
| **-netîce dan** | 1. encam dan2. bi dawî bûn |
| **netrik** | xemla zîvîn a eniya jinan |
| **netû** | 1. yax 2. eware |
| **neve** | keça zarokê mirovî |
| **neveçirk** | neveya neve û neviyî |
| **nevisî** | zarokê ji kesekî/ keseka din (ji bo jinê zarokên hêwiya wê, ji bo mêrî zarokê mêrê jina wî yî berê) |
| **nevî** | kurê zarokê mirovekî |
| **nevîçirk** | neviyê neve û neviyî |
| **newa** | 1. dengên ahengdar2. dengên mûsîqayî |
| **newal** | cihokên kûr *“av ji çiyan diherike, li newalan belav dibe” |
| **newêd** | 1. hejmara piştî heştê û nehan 2. jimareya90’î |
| **newêrek** | tirsonek, ziravqetî newêrîn tirsîn |
| **newq** | di lêş de her du kêlekên bêhestî û vala |
| **-newq kiyan/kutan** | hilkehilk kirin |
| **nex** | şaxên tayekî |
| **nexasim** | nemaze |
| **nexifîn/dinex ife/binexife** | 1. bersojkî bûn 2. hinav xera bûn |
| **nexş** | hunera kêşan û çêkirina nîgar û resman li ser kevir, kaxez, pîne û hwd |
| **nexşe** | agehiyên erdnîgarî ên xêzkirî; xerîte |
| **nexşesazî** | pisporiya xêzkirina xerîteyan |
| **nexşenîgarî** | pîşekariya xêzkirina xerîteyan; nexşesazî |
| **next** | 1. neqd 2. qelend |
| **nexuya** | nediyar, nedîtbar |
| **nexwe** | wisa ye |
| **nexwende** | nezanê xwendinê*“kesê nexwende, weke dara bê ber e” |

| | |
|---|---|
| **nexweş** | 1. kesê ku rewşa wî ya tenduristî xera bûye, nesax 2. neçê 3. kirêt *“bextê reş, mirovan dike nexweş” |
| **nexweş bûn** | nesax bûn, azî kirin, bi êşekê ketin |
| **nexweşî** | 1. nesaxî 2. nebaşî3. kirêtî |
| **-nexweşiya dirmdar** | êşa ku ji kesekî bêtendurist belavî dorê dibe |
| **nexweşxane** | saziya tîmarkirina nexweşan |
| **ney** | amûreke mûsîqayî ya pifkirinê ye; bilûr |
| **neyeksan** | newekhev |
| **neyjen** | bilûrjen |
| **neyar** | 1. dijmin 2. reqîb*“ji neyaran re, zarê şirîn û pişta hişk” |
| **neyarî** | 1. dijminî 2. hevrikî |
| **neyînî** | 1. tiştê ku bersiva wê na ye û ne erê ye; menfî 2. ramana ku aliyê nebûna tiştekî diangêje |
| **neynik** | şûşeya ku mînaka mirovî berevajî dike û mirov xwe tê de dibîne; awêne *“xelq, neynika meriyan e” |
| **neynûk** | nenîk *“filan kes neynûk tune xwe pê bixwirîne” |
| **nezan** | 1. cahil 2. nebeled*“ar, ji kesê nezan re bar e” |
| **nezanî** | 1. cahiltî 2. nebeledî |
| **nezer** | 1. çavînî 2. çavlêgerandin*“nezer, keviran jî diteqîne” |
| **nezer kirin** | 1. lê nêrîn 2. bi niyêta xera lê nihêrîn |
| **nezêk** | stewr |
| **nezir** | boraq |
| **-nezir kirin** | boraq bexişandin nezok nezêk |
| **nêçîr** | 1. karê lêgerîn û kuştina giyandarên kovî; seyd, rav 2. ajala ku seydvan li pey dikeve*“bi tajiyê xelqê, nêçîr nabe” |
| **nêçîrgeh** | qada nêçîrê; ravgeh |
| **nêçîrvan** | kesê ku li pey kuştin û girtina ajalên beriyê û firindeyan diçe; seydvan/ravker *“nêçîrvan, nêçîra xwe nas dike” |
| **nêçîrvanî** | seydvanî |
| **nêk** | nîk |
| **nêm** | kêm û îltihab |
| **-nêm girtin** | kêm û îltihab girtin |

| | |
|---|---|
| **nêr** | 1. mêr 2. sewalê bi mûzî 3. hêşînahiya qamir a ku nayê xwarin*“berxê nêr, li ber du makan e” |
| **nêrek** | navnêrî |
| **nêremê** | xunsa, jinemêr |
| **nêreng** | cadûbaz, sîhirbaz |
| **nêrevan** | pandî, panêr |
| **nêrg** | 1. hêzdar 2. tund |
| **nêrgiz** | cureyekî kulîlkan e*”bi nêrgizekê bihar nayê” |
| **nêrik** | qed an jî bistiya ter a giyayên ku tên xwarin |
| **nêrit** | rewişt û tîtal |
| **-nêrîta civakî** | rewişt û tîtalên ku civak ji xwe re datîne û dijberê wan tê şermezarkirin; rayîşa civakê |
| **-nêrîta giştî** | rayîşa ku di nav hemû civakê de tê pejirandin û dijberê wê tê sezakirin |
| **-nêrîta ramyarî** | rewişt û tîtalên ku rêvebiran pejirandine û dijberê wan ji çavê gelê xwe dikeve nêrî hevserê bizinê *“karê sêwî, nabe nêrî” |
| **nêrîn [I]** | mêrtî |
| **nêrîn/dinêre /binêre [II]** | 1. nihêrtin 2. mêze kirin3. dîtin |
| **nêrîz** | cureyekî xenceran e |
| **nêving** | 1. li gor her kes û tiştî cih û warê ku lê ye2. rayîşa civakê |
| **nêxin** | mêwij |
| **nêz [I]** | birçî |
| **-ji nêz de mirin** | ji birçînan mirin |
| **nêzdemirî** | kesê ku ji birçînan miriye |
| **nêz/nêzîk [II]** | 1. ne li dûrê2. berdest |
| **nêzîk bûn** | 1. hatin hindê2. li kêlekê rawestin |
| **nicimîn/dinicime/binicime** | lingîrî bi rê ve çûn; kulîn |
| **niçandin/diniçîne/bi niçîne** | 1. nav tê dan 2. temas kirin 3. bi dest hişyar kirin |
| **niç** | dengê nepejirandinê |
| **niçeniç** | dengê domdar ê nepejirandinê |

| | |
|---|---|
| **niçeniç kirin** | bi peyveke nediyar nerazîtî xuya kirin |
| **niçik** | 1. di raçandinê de çaviyên ku davêjên firêta tevnê 2. nik, nikil |
| **niçîn/diniçe/ biniçe** | 1. temas lê bûn 2. kirkirîn |
| **nifaq** | munafiqtî, durutî*“nifaq û îtifaq, li ba hev nabin” |
| **nifir** | tikaya ji bo ku kesek/tiştek tûşî karesatekê bê *“ez bi duayên te çênebûme ku bi nifirên te jî bimirim” |
| **nifir kirin** | bedua li yekî kirin |
| **nifrîn** | nizaya xirabiyê; nifir |
| **nifsî** | qutikê giranbiha yê ku di bin de tê lixwekirin |
| **nifş** | nesil, zuriyet, dûm |
| **nifşparêz** | kesê ku cudahiyê dixe navbera irq, dîn û deveran, xwe ji xelqê berztir û pîroztir dizane |
| **nifşnas** | pisporê nesla rehek û giyaneweran |
| **niftik** | kibrît, pîçke |
| **nigran** | dudil |
| **nigranî** | dudilî |
| **niha** | 1. ne berê ne jî paşê, ev dema ku em tê de ne2. (r) dema têdeyî |
| **nihan** | 1. nehên, nepen 2. veşartî |
| **nihanî** | 1. (di dema baran û berfê de) cihê ku mirov bikaribe xwe bi de ber; berqef 2. avayî *”ewrê sor ê spêdeyan, gazî dike karwaniyan, xwe bidine nihaniyan” |
| **nihêl** | erdê ku tê de çal, kort û kêrt hene |
| **nijad** | 1. irq, regez 2. zayend3. netewe |
| **nijadkujî** | qirkirina neteweyekê |
| **nijadperest** | 1. regezperest2. neteweperest |
| **nijde** | 1. êriş 2. talan 3. cerde |
| **nijdevan** | 1. rêgir û xelqşêlandî2. talanker 3. cerdevan |
| **nijdevanî** | 1. rêgirî 2. cerdevanî3. talankerî |
| **nijinandin/di nijinîne/ binijinîne** | bi awayek endazeyî ava kirin; jenandin |
| **nijinîn/diniji ne/binijine** | 1. ava bûn 2. hênijîn, pokinîn |

| | |
|---|---|
| **nijtin/dinije/ binije** | 1. qewirandin 2. bera yekî dan |
| **nik** | hind, rex, kêlek |
| **nikil** | 1. bêfila firindeyan2. lûtke |
| **nikilreş** | nexweşiyeke firindeyan e |
| **nikilreşî** | firindeya ku bi nikilreşê ketiye |
| **nimandin/di nimîne/bini mîne** | 1. nîşan dan 2. sêwirandin 3. hewandin |
| **nimêj** | 1. perestişa misilamanan a rojê penc danan û di hin warên din de 2. dirozge |
| **-nimêja nafileyê** | 1. ne nimêja ferzbûyî, nimêja xêrê 2. di îslamê de nimêja hin danên bixêr |
| **-nimêja qezayê** | nimêja ku di wextê wê yê diyar de nehatiye kirin |
| **-nimêj kirin** | îbadeta misilmanan bi cih anîn |
| **-nimêj derbas kirin** | di wextê wê yê diyar de nimêj nekirin |
| **-nimêj qeza kirin** | 1. nimêja xwe ya derbasbûyî bi cih anîn 2. ber kesekî ku nimêj derbas kirine ve nimêj kirin |
| **nimêjkar** | kesê ku bi berdewamî ji Xwedê re îbadetê dike *"heke nimêjkarek tunebe, pêxasekî bigire û bîne" |
| **nimînandin/ dinimînîne/ binimînîne** | temsil kirin |
| **nimînende** | 1. nûner, temsîlkar2. qasidê saziyekê |
| **nimûne** | 1. mînak 2. ibret |
| **niqik** | derince, pîle |
| **niqir** | kêrtik, girtik |
| **niqirandin/di niqirîne/ biniqirîne** | 1.kêrtik-kêrtikî kirin, girtikgirtikî kirin2. tê de cerx vekirin |
| **niqêm** | cureyekî kevirên giranbiha ye |
| **niqîn/diniqe/ biniqe** | axînî kirin, ofînî kirin |

| | |
|---|---|
| **niqniqandin/ diniqniqîne/ biniqniqîne** | 1. devjenî kirin 2. belapêşkarî hev bûn |
| **niqre** | sîtila tehtevêlkî |
| **niqrosk** | dema ku xew dikeve çavan û serê mirovî xwar dibe |
| **-niqrosk hatin** | hênijîn û stû di aliyekî de xwar bûn |
| **niquçandin/ diniquçîne/bi niquçîne** | 1. niçandin2. quncirandin |
| **niqut** | dilop, çilk |
| **niqutandin/d iniqutîne/ biniqutîne** | dilopandin, çilkandin |
| **niqutîn/diniq ute/biniqute** | dilopîn, çilkîn |
| **nirên** | dengê miremirê yî dirindeyan |
| **nirîn/dinire/ binire** | (dirindeyên mînanî şêr, pi ling û hwd) miremir kirin |
| **nirx** | 1. biha 2. qedr |
| **-nirxên mirovahiyê yên gerdûnî** | her tiştê ku her kes giramiyê jê re digire |
| **nirxandin/di nirxîne/binir xîne** | 1. bihanameya kel û pelan danîn ser 2. erênî û neyîniya mijarekê destnîşan kirin; dahûrandin 3. ferisandin |
| **nişdar** | bijîşkê şkestekan; cerah |
| **nişdarî** | bijîşkiya şkestekan; cerahî |
| **nişêt** | nîşane, elamet |
| **nişirîn/dinişir e/binişire** | 1. bişkuvîn 2. pizirîn |
| **nişîn/dinişe/ binişe** | niştin |
| **nişîngeh** | niştingeh |
| **nişîv** | 1. xwar 2. nizm 3. jêr |
| **nişmî** | neşmî |

| | |
|---|---|
| **niştecih** | akincî, şênî, dêman |
| **niştiman** | 1. memleket 2. welat *“niştiman bi çekan tê vegirtin û bi çekan tê standin” |
| **niştimanper wer** | hezkiriyê welatê xwe |
| **niştin/dinişe /binişe** | 1. rûniştin 2. bi cih bûn 3. lê danîn *“ji hespê daket, li kerê nişt” |
| **niştingeh** | cihê ku mirov lê îqamet dike |
| **nitirandin/di nitirîne/ binitirîne [I]** | 1. kesek lê dan telandin 2. payandin, dan raçav kirin |
| **nitirandin/di nitirîne/ binitirîne [II]** | bi tiştekî tûj) dar neqişandin û li serê tiştin nivîsandin |
| **nitirandin/di nitirîne/ binitirîne [III]** | 1. xemilandin2. arastin |
| **nivan** | 1. mêvan, misafir2. rêwî |
| **nivandin/din ivîne/binivîn e** | 1. bi xew re kirin2. awilandin |
| **nivistin/diniv e/binive** | 1. nivîn, pal dan, razan2. telexewî bûn |
| **nivişt** | kaxeza ku dua lê tên nivîsandin û di cihekî de tê daliqandin; hemayîl, bazbend |
| **niviz** | nizm *“cihê bilind, ji mirovê niviz çêtir e” |
| **nivîn [I]** | cihê ku li ser tê razan |
| **nivîn/dinive/ binive [II]** | nivistin |
| **nivîs** | 1. xet, mextût 2. di mijarekê de derbirina nivîskî |
| **nivîsandin/di nivîsine/ binivisîne** | 1. xet kirin2. bi tîpan xêz kirin |
| **nivîsgeh** | 1. cihê ku kar û bar lê tên gerandin 2. kargeha ku kar û barên nivîsan lê tên gerandin |
| **nivîsîn/dinivî se/binivîse** | nivîsandin |
| **nivîskar** | 1. kesê ku berhemeke nivîskî çêkiriye 2. kesê ku bi tîpan tiştin xez kirine |

| | |
|---|---|
| **nivîskî** | kitêbî, ne devkî |
| **nivîşk** | rûnê nû yê mastê kiyandî |
| **nivîşkan** | kesê ku hin endamên wî bi nîvî nîvî dixebitin; nîvco, kêmlebat |
| **nixamtin/dinixême/binixême** | nixumandin |
| **nixav** | kûrik, pifik |
| **nixav kirin** | kûrik tev dan û geş kirin |
| **nixumandin/ dinixumîne/ binixumîne** | 1. veşartin2. çal kirin, bincil kirin 3. serpeçûm kirin |
| **nixurî** | zaroyê yekem ê dê û bavan |
| **nixwê** | tiştê ne şor; bêxwê |
| **niwênt** | fîlm |
| **niwêntgeh** | cihê ku fîlm lê tên pêşandan |
| **niyan/dinê/binê** | 1. gayîn2. hiltirandin, tûş bûn 3. tewişîn |
| **niyar** | 1. dik 2. lîstikvan3. karê ku lîstikvan li ser dikê pêk tîne |
| **niyarî/niyarvan** | lîstikvan |
| **niyaz** | daxwaz |
| **niyêt** | 1. mebest 2. daxwaz*"niyêta dilan, qeda sêrî" |
| **-niyêt kirin** | 1. dil hebûn2. daxwazek di zêhna xwe de gerandin 3. (ji bo îbadetekê) meqsed diyar kirin |
| **niza** | daxwaza ji Xwedê; dua |
| **niza kirin** | ji Xwedê daxwazek kirin; dua kirin |
| **nizar** | 1. cihê ku tav lê nagire; qûze 2. jar |
| **nizeniz** | dengê domdar ê daxwaza tevî girî û naziyan |
| **nizeniz kirin** | (bi nazî û girî) daxwaz kirin |
| **nizilandin/dinizilîne/ binizilîne** | 1. dawerivandin2. raparzandin |
| **nizilîn/dinizile/binizile** | 1. dawerivîn 2. raparzîn |

| | |
|---|---|
| **nizilok** | parzûn |
| **nizm** | nebilind û daketî*"av, cihê nizm de dikişe” |
| **nizmahî** | nebilindî û daketîtî |
| **nizm bûn** | daketin û bilind nebûn |
| **niznizok** | zarokê ku bi girî û naziyan tiştan dixwaze |
| **nîçik** | gilik |
| **nîç kirin** | 1. (heta ku dilopek jê nemîne) vexwarin, noşîn 2. bi ser xwe ve kirin û bi temamî daqurtandin |
| **nîgar** | resim |
| **nîgare** | 1. wêneyê ku bi dest hatiye xêzkirin 2. moçik |
| **nîgar kirin** | 1. xêz kirin 2. şayese kirin 3. sêwirandin |
| **nîgarkêş** | kesê ku nîgareyan dikêşe |
| **nîgaş** | Xeyal |
| **nîgaşî** | xeyalî, aşopî |
| **nîk** | 1. tîxe 2. hesinê kevankirî yê serê doxteşiyê3. derziya kevan a masîgiriyê |
| **nîma** | 1. nîvê heyvê 2. hîva çardeşevî |
| **nîn** | 1. net 2. Tune |
| **nîr [I]** | dar an jî hesinê ku didine ser stûyê ga û gamêşan da ku erebeyê an jî cotî bikêşin *“gayê qelb, nîr dişkîne” |
| **nîr [II]** | dem nîsan meha avrêlê *“nîsan e, dew li kîsan e” |
| **nîsk** | cureyekî zêd e û piranî jê şorbe tê çêkirin*“nîskê mevêjin dewsa kizinê, berxê mevêjin berê bizinê, malê nebin cem malbavana jinê” |
| **nîske** | alavake ku ji şûşeyê tê bidestxistin û bi kêrî mezinkirina tiştên pir biçûk tê |
| **-nîskeya bijîjkiyê** | cureyekî nîskeyên ku di zanistên bijîjkiyê de tê bikaranîn |
| **-nîskeya çêv** | di çavan de beşa ku bînahiyê zelal dike |
| **nîsko** | Zûxeydok |
| **nîskok** | di fîzyayê de navenda tevgerê |
| **nîşan** | 1. elamet 2. şop 3. xelata serkeftinê *“nîşana mirinê, xwederîtin e” |
| **-nîşan dan** | 1. nimandin2. pêşandin, rapêşandin*“ji tunebûna şêran, rovî xwe nîşan didin wek guran” |
| **nîşane** | Nîşan |
| **nîşangeh** | nikilê ku bi serê çekan ve ye û bi kêrî rastlêxistinê tê; mêşa tifingê |

| | |
|---|---|
| **nîşanî** | xelatên bûkê yên ku elameta zewaca şûkirina wê ye |
| **nîşanî kirin** | (da ku şûkirina wê eşkere bibe) xelatek dan bûkê |
| **nîşank** | elametên leşkerî |
| **nîşe** | têbinî, kurterave |
| **nîşgeh** | 1. li balafirgehê qada daketina balafiran2. qada daketina firokeyan |
| **nîtik** | nîçika quzan |
| **nîv** | 1. ji du parçeyan parçeyek2. ji du paran parek*"rev, nîvê mêraniyê ye" |
| **-bi nîvî bûn** | bi qasî ji du paran parekê rê hildan |
| **-di nîva xwe de qurifîn** | 1. di navendê de qut bûn 2. di ciwaniya xwe de mirin |
| **nîvek** | ji du paran parek |
| **nîvekarî** | hevpariya bi nîvenîvî |
| **nîvenîv** | bi qasî ji du paran parek |
| **nîvî** | Nîvek |
| **nîvkad** | Nîvçember |
| **-nîvkada parzemînî/erdîn** | beşa dinyayê ya ku bejahî ye û piraniya wê li nîvkada bakur e |
| **-nîvkada deryayî** | beşa cîhanê ya ku ji sedî heftêyê wê derya ye |
| **nîvro** | danê ku tav di nava esmên de xuya dibe û siha heyberan bi qasî cîsman dibe |
| **no** | 1. tûj 2. xeşîm û bi tund 3. dirinde *"hirçê no, nayê rê" |
| **nobe** | Dor |
| **nobedar** | Nêrevan |
| **nod** | Newêd |
| **nodem(-în)** | di rêza newêdî/nodî de |
| **nogin** | çêleka sêsalî |
| **nok** | cureyekî zêd e û xwarinên curecureyî jê tên çêkirin *"nok heye diran tuneye, diran heye nok tuneye?" |
| **noker** | 1. hevpişkê karên neçê 2. xulamokê berjewendiyên xelqê |
| **nokik** | rêjeya hejmarî ya ku di azmûnê de tê hildan |
| **nola/nolî** | 1. mîna/mînî, mînanî 2. weke/wekî |
| **noq** | binavbûn, gutbûn |

| | |
|---|---|
| **noqandin/di noqîne/bino qîne** | binav kirin, di avê de gut kirin |
| **noqar** | navgîna zeryayî ya ku di binê avê de diçe |
| **noqav** | bûn binav bûn, di avê de gut bûn |
| **noş** | 1. afiyet 2. tenduristî |
| **-noşî can be** | afiyet be, loşî can be! |
| **noşav** | hemû cureyên vexwarinê, meşrûbat |
| **noşîgiyan** | pîrozkirina yekî ji ber kinca wî ya nû an jî xebata wî ya baş |
| **noşîgiyan kirin** | (kesek ji ber tiştekî baş ve) pîroz kirin |
| **noşîn/dinoşe /binoşe** | bi xweşî û dilaramî vexwarin*“dew tune binoşe, li çarsî û bazaran rûn difiroşe” |
| **notirvan** | nobedar |
| **nozde** | 1. hejmara beriya bîstî û piştî hejdehan 2. jimareya 19’î |
| **nuhtin/dinuj e/binuje** | 1. îsabet kirin 2. hingaftin3. sotin |
| **numayîş** | xwepêşandan |
| **numayîşgeh** | qada xwepêşandanê |
| **nuqte** | xal |
| **nuqteşanî** | xalbendî |
| **nuqurçandin /dinuqurçîne / binuqurçîne** | niquçandin |
| **nuwaze** | pir bedew, pir delal |
| **nû** | teze, ne kevn *“nû hatin, kevn hilatin” |
| **nûbar [I]** | berê nû û teze |
| **nûbar [II]** | cureyekî kevanên ku pê çend tîr bi hev re tên avêtin |
| **nûbar [III]** | doran nû bûn teze bûn |
| **nûciwan** | xortê nûgihiştî |
| **nûçe** | 1. xeber 2. agehiya di heqê bûyerekê de |
| **nûçegihan** | kesê rûdanan digihîne çapemeniyê; salixdayî |
| **nûjen** | hevdem |

| | |
|---|---|
| **nûjenî** | hevdemîtî |
| **nûma** | heyvik, hilal |
| **nûn** | pênasa hera asan a heyberên fîzyayî û kîmyayî |
| **nûner** | 1. temsîlkar, nimînende2. qasidê saziyê |
| **nûrandin/dinûrîne/binûrîne** | 1. qat kirin 2. jenîn, dan ser hev 3. bi keys kirin |
| **nûser** | nivîskar |
| **nûz** | tahmxweş |
| **nûza** | têjika ku nû ji maka xwe bûye |
| **nûzenûz** | kûzekûz, kûrekûr |
| **nûzenûz kirin** | kûzekûz kirin, kûrekûr kirin |

# O

| | |
|---|---|
| **o/O** | tîpa hejdehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdêreke dirêj e, cîderka wê paşderkî ye, di belavbûna wê de dev gilover e û asta belavbûna wê nizm e |
| **-o! [I]** | baneşana gazîkirinê ya nêrzayan e mînak: Heseno tu li ku yî!/welato tu xweş welatî! |
| **-o {II]** | 1. paşgireke rengdêrsaz e mînak: kuşo, fîto, gildo, gêjo 2. paşgireke kurtkiriniyê a serenavan e mînak: Cindo, Misto |
| **ober** | çarşeva mezin |
| **oberik** | çarşeva biçûk |
| **ode** | jûr |
| **of!** | baneşana bêhntengiyê |
| **ofeof kirin** | 1. ji ber xem an jî êşekê gotin: ‘of!’ 2. ber tiştekî ketin |
| **ohr** | tewl bi tewl çêrandina sewalan |
| **ohr bûn** | (da ku sewal biçêre) di kêp de tewilîn |
| **ohr kirin** | (da ku sewal biçêre) kap kirin û tewilandin |
| **ol** | 1. mezheb, terîqet 2. dîn |
| **olam** | 1. xizmet 2. paletiya xelqê *“axa bi xulam, bi olam û bi tentene ye” |
| **-olama dewletê** | xizmeta mecbûrî |
| **olamkar** | 1. xizmetkar 2. paleyê xelqê |
| **olamkarî** | 1. xizmetkarî2. paletiya xelqê |
| **olan** | halan |
| **olan dan** | 1. deng vedan, bang vedan 2. halan dan |
| **olaq** | hespê ku ne esîlza ye |
| **olçim** | devbelaş, devçepel |
| **oleder** | tevgera dijî dîn û terîqetê |
| **olederî** | dijberiya dîn û terîqetê |
| **oldar** | dîndar |
| **olintî** | bêkar û xemsar |
| **olî** | dînî |
| **olk** | ohr |

| | |
|---|---|
| **olperest** | dîndarê nezan |
| **omet** | umet |
| **omit** | mefer, hêvî |
| **omitî** | dilovan |
| **-omitî li yekî kirin** | li cihekî xerîb li yekî xwedî derketin |
| **-omit kirin** | hêvîdar bûn |
| **omitwar** | hêvîdar |
| **onc** | kemax |
| **onî** | darên ku li gor hin pîvanan qutkirî, kereste |
| **oqe** | cureyekî mengiraniya îslamî ye or zik |
| **ormeşk** | ziktêrdek |
| **orqelêş** | dirindeyê ku zikê nêçîra xwe diqelêşe |
| **oran** | bistikê tiştê çandî; qesel |
| **oreor** | dengê dewêr; borebor |
| **-oreor kirin** | (dewar) qareqar kirin |
| **orisp** | fuhûş, qûndetî |
| **orispî** | fahişe, qûnek |
| **orîn/diore/bi ore** | qarîn(dewar) |
| **orînî** | oreor |
| **-orînî pê ketin** | ji nişkê ve oreor kirin |
| **oro!** | lo! |
| **ote** | ode |
| **ox!** | baneşana kêfxweşiyê |
| **oxilme** | 1. lêgerin û teselîkirin2. ceng û çop |
| **-roja oxilmeyê** | heyama ceng û çopê |
| **oxilme kirin** | 1. teselî kirin2. lê gerîn |
| **oxir** | yom, qudûş |
| **-oxir be** | riya te vekirî û bê teşqele be |
| **oxweş!** | baneşana şabûnê |

| | |
|---|---|
| **-oxweş bûn** | 1. (di zimanê zarokan de) pir xweşik bûn 2. bi rewşa heyî şabûn |
| **-oxweş kirin** | bi rewşa pêkhatî kêfa xwe anîn |

# P

| | |
|---|---|
| **p/P** | tîpa nozdehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê lêvkî ye û awayê belavbûna wê girtî û hişk e |
| **pa** | pê |
| **pace** | di avahiyan de her kuna ku li derve dinêre |
| **pacerê** | di dîwarên avahiyan de valahiyên ku ji bo ronahiyê tên hiştin û çarçiveyeke camkirî tê de tê bicihkirin |
| **pac** | nîşaneya serketinan a ku didine kesê serketî |
| **paç [I]** | careke ramûsanê*“kîr bi paçan mezin nabe” |
| **-paç kirin** | ramûsandin |
| **paç [II]** | pirtiyê qumêş |
| **-paç li sêrî girêdan** | keça xama zewicandin |
| **paçal** | zengo |
| **paçe** | 1. devling, pance 2. ser û piyên sewalên ku goştê wan tê xwarin 3. şorbeya ser û piyan |
| **paçik** | 1. piyên biçûk 2. tiştê ku hatiye pêçan 3. bûjenên pêçayî yên ji karistanê3. parçeyeke qûmêş *“kum hebin, paçik zehf in” |
| **paçik kirin** | 1. tiştek lê alandin 2. bûjeneke ku hatiye hilberandin tiştek lê alandin (kirin qutî, sindoq û derdankên din) |
| **paçinî** | 1. sergincir 2. qirêjok |
| **paçî** | (di zimanê zarokan de) maç, ramûsan |
| **paçî kirin** | (di zimanê zarokan de) maç kirin, ramûsandin |
| **padaş** | 1. diyarî 2. qencî3. şabaş 4. xelat |
| **padaş kirin** | xelat kirin |
| **padîşah** | paşe |
| **pag** | 1. xirbe, kelefe 2. erdê ku lê avahî tên çêkirin; erse |
| **pageh** | qatê binî; jêrzemîn |
| **pager** | gera hêzên ewlekariyê ya di nav taxan bi awayekî dorvegerî |
| **pahn** | pehn |
| **pahnik** | pehnik |

| | |
|---|---|
| **pahnî** | panî |
| **pahtin** | pehtin |
| **paj** | pişk, par |
| **pajne** | paniya solê |
| **pak** | 1. paqij 2. çê 3. qenc |
| **pak bûn** | 1. çêbûn 2. paqij bûn *“bav ku pak bûya, ev zuriyet bi dû nediket” |
| **pakdil** | dilpaqij |
| **pakî** | 1. çêyî 2. paqijî *“cihê ku pakî dest dide, xerabî çi ye?” |
| **pakîze** | 1. paqij 2. duşîze |
| **pak kirin** | 1. qencî kirin 2. paqij kirin 3. bijûn kirin |
| **paknivîs** | nivîsa ku baş tê xwendin |
| **pakrewan** | şehîd |
| **pakrewanî** | şehadet |
| **pal** | 1. qûntara çiyê 2. pişt3. zevî |
| **palan** | kurtanê ku davêjin ser pişta keran *“şohreta kerî, palanê wî ye” |
| **-palan qelibandin** | dest bi zexeliyê kirin û fizirîn |
| **palas** | berika ji mûyê bizinan*“heft hevling, li ser palasekê di avê de diçin” |
| **palav** | kîsê xavik û tenik ê ku ser zarok û têjikên nûbûyî di dundirê wî de tên dinyayê |
| **-palav dalêstin** | (maka têjikê) bi dalistinê têjik ji kîsê xavik û tenik rizgar kirin |
| **palavtin/dipalêve/bipalêve** | paravtin |
| **palavgeh** | cih û îzgeha dawerivandina bûjenan |
| **palavte** | 1. parzûn 2. tiştê raparzandî |
| **palax** | 1. cureyekî çêreyê ye 2. çêreya dirêj û himbiz |
| **pal dan** | 1. spartin 2. velezîn3. razan |
| **paldank** | 1. kursî, sendelî2. piştek, balîf 3. sparte |
| **pale** | karker, îşkar, kirêkar*“dasa paleyî, nayê dizîn” |
| **palem** | pêşa dirêj a ku digihêje erdê |
| **paletî** | xebata li kargeh, zevî, bax û rezan a bi destheqekê |
| **palewan** | 1. gemşo, zoranker2. mêrxas |

| | |
|---|---|
| **palewanî** | 1. gemşoyî, zorankerî2. mêrxasî |
| **palgeh** | 1. balîf 2. kursî |
| **palik** | 1. barê biçûk 2. cilika ku di bin kurtên de davêjin ser pişta keran |
| **palir** | erdê ku dora wê hatiye sûrkirin |
| **palpişt** | piştek |
| **palpiştî** | 1. destek 2. hevpişkî |
| **palûke** | karistan |
| **palûte** | xebata bi karbeşî |
| **paldûm** | qûş |
| **pan [I]** | payîn |
| **pan [II]** | pehn |
| **panaz** | mucewherên qulebî/ sexte |
| **pance/panci k** | devdeling |
| **-pance hilçinîn** | devdeling hildan jorê |
| **pançilokî** | 1. qermîçokî 2. daliqî |
| **pançilokî bûn** | 1. qermîçokî bûn 2. daliqîn |
| **pandirûs** | nîvco, nivîşkan |
| **pandî** | çavdêr |
| **pandîgeh** | çavdêrxane |
| **panêr** | pandî |
| **pangeh** | gom |
| **panik** | pehnik |
| **panî** | 1. paşiya pê 2. dawiya solê *“ê ku jinê berde, li paniyê nanêre” |
| **panjehr** | dermanê jehrkuj |
| **panos** | 1. çira 2. şemal |
| **-panosa deryayî** | çiraya zeryayî |
| **papûç** | pêlavên zarokan |
| **papûr [I]** | riya erebeyan, riya şoşê |
| **papûr [II]** | alava ku li serê xurek tê pehtin û bi neftê dixebite |

| | |
|---|---|
| **papûr [III]** | keştiya rêwiyan |
| **paqij** | 1. pak, neqirêj 2. xwîşirîn 3. şûştî |
| **paqijî** | 1. pakî, neqirêjî 2. xwîşirînî 3. şûştîtî |
| **-paqijiya regezî** | şer û qirêna dijî irqekê ku hebûna wî li herêmekê nayê xwestin |
| **paqij kirin** | 1. pak kirin 2. şûştin |
| **par [I]** | sala borî *"feqîr û jar, wek par û pêrar" |
| **par [II]** | 1. behre 2. beş 3. hise 4. bir *"du parên xizaniyê, nezanî ne" |
| **par [III]** | 1. paş, dû, pişt2. pişt ve |
| **-ji paran ve** | ji aliyê piştê ve; paş ve |
| **parak** | cureyekî xwarinê ye û ji êrd tê çêkirin |
| **parastin/diparêze/biparêze** | **1**. berevanî kirin2. hemete kirin *"gund, bê se nayê parastin" |
| **parav [I]** | 1. kesê ku her dem galte, henek û pêkenînan dike û ji tixûban dertê 2. bizava beredayî û bêbingeh |
| **-paravek dan xwe** | (her çiqas ziravqetî be jî) xwe gijgijandin û rahiştin karekî |
| **parav [II]** | galte, henek |
| **parav [III]** | 1. teze, nû 2. ter, şil |
| **paravî [II]** | baravî, dawerivî |
| **paravî bûn** | baravî bûn, dawerivîn |
| **paravî kirin** | baravî kirin, dawerivandin |
| **paravtin/diparêve/biparêve** | **1**. dakirin 2. parzûnandin 3. dawerivandin |
| **parçe** | 1. jê hinek 2. par3. tîke 4. beş |
| **parçe bûn** | 1. jê hinek veqetîn2. parve bûn 3. tîke bûn 4. beş bûn |
| **parçe kirin** | 1. jê hinek veqetandin 2. parve kirin3. tîke kirin 4. beş kirin |
| **parçeparçeyî** | 1. parparî2. tîketîkeyî 3. qisimqere4. hûrhûrî |
| **parçeparçeyî bûn** | 1. parparî bûn 2. tîketîkeyî bûn 3. qisimqere bûn 4. hûrhûrî bûn |
| **parçeparçeyî kirin** | 1. parparî kirin 2. tîketîkeyî kirin 3. qisimqere kirin 4. hûrhûrî kirin |

| | |
|---|---|
| **pardar** | 1. şirîk 2. hevpar |
| **pardarî** | 1. şirîkatî 2. hevparî |
| **pardem** | xebata yekdanî/ nîvrojî |
| **parêz** | 1. li gorî pîvaneke tenduristî mîhengkirina xwarin, vexwarin û têkiliya zayendî 2. bîstan |
| **-parêza devê xwe nekirin** | persenga devê xwe û endazeya gava xwe nezanîn |
| **parêzer** | 1. kesê ku ber yekî din ve berevaniyê dike 2. wekîlê qanûnî |
| **parêzgar** | 1. walî 2. serdar |
| **parêzgarî** | 1. wilayet 2. eyalet |
| **parêzgeh** | 1. bingehê parastinê2. cihê karê serokê bajêr; baregeha bajarvaniyê3. bajarê mezin ê ku bi destê parêzgarekî tê rêvebirin |
| **parêzkar** | 1. muhafezekar2. mertalê ji bo xweparastinê |
| **parêzkarî** | muhafezekarî |
| **parêzname** | nameya beravanîkirinê ya li dadgehê |
| **pargon/pargûn** | cihoka biçûk a li dora konan |
| **parî** | xwarina bi qasî daqurtandinekê; cûmeke xwarinê *"giliyekî wisa bibêje ku pariyekî nên bipêje" |
| **parjimare** | jimareyên dabeşkirinê; jimareyên şikestî yên wekî 1.5, 3.6 û |
| | hwd |
| **parjinandin/diparjinîne/biparjinîne** | (r) hevokek ji aliyê rêzimanî ve dahûrandin û ferisandin |
| **parî [I]** | xwarina bi qasî cûmekî |
| **-parî di dêv de werimîn** | qotê devê xwe cûtin û qurt nekirin |
| **parî [II]** | cureyekî çêreya ku dişibihe xilorkê |
| **par kirin** | beş kirin, teqsîm kirin |
| **parleşker** | di herêmekê de milekî artêşê |
| **parmend** | 1. hevpar 2. xwedîpar, şirîk |
| **parmendî** | 1. di karekî de hevparî 2. di qezencekê dexwediyê pareke kifşkirî; şirîkatî |
| **paronek** | golikê yeksale |

| | |
|---|---|
| **pars** | destê xwe dirêjî xelqê kirin da ku sedeqeyekê bidinê; rewcî, gedandin*“bila dil bi dil be, tûrikê parsê li mil be” |
| **parsek** | rewcîger, geda*“du parsek, li deriyekî nabin” |
| **parseng** | perseng |
| **parsiw** | parsû |
| **parsî** | parsû *“parsiyê jinê xwar e” |
| **pars kirin** | rewcî xwastin, gedandin |
| **parsû** | hestiyên parxanê |
| **part** | 1. 30 gurzên giyayî2. lûsên zadê çinandî |
| **partî** | rêxistina bipergal |
| **partîzan** | 1. alîgir 2. hewandiyê rêxistineke bipergal |
| **part kirin** | 1. 30 gurz giya dan ser hev 2. zadê dirûtî lûslûsî dan ser hev |
| **partpartî** | 1. komkomî 2. lûslûsî |
| **partpartî kirin** | 1. komkomî kirin 2. lûslûsî kirin |
| **parxan** | hestiyên ku di her du kêlekên lêş de ne |
| **parxêl** | ereboka hespan |
| **parzemîn** | ji şeş parçeyan her parçeyekî nîgaşî yê cîhanê yî wek: asya, ewropa, amerîka, awistralya, afrîqa, antarktikayê |
| **parzûn** | alava dawerivandinê |
| **parzûnandin /diparzûnîne / biparzûnîne** | 1. raparzîn 2. dawerivandin |
| **pas** | 1. tiştê servekirî 2. rût û tazî |
| **pasar** | 1. parçeyê ku di serbanê de dirêj dibe 2. rêşiyên ku bi serê xalîçeyan ve dirêj tên hiştin |
| **pasawe** | hincet, behane |
| **pasevan** | 1. nobedar 2. parastvan |
| **pasik** | 1. rastahiya vala 2. qad, meydan |
| **paspaye** | bêkesayet |
| **pastîn** | paşstû, berstûk |
| **paş** | 1. pişt 2. dawî |
| **-paşê** | piştî vê û ne niha |

| | |
|---|---|
| **-bi paş ve avêtin** | 1. egle kirin, taloq kirin 2. bi derengiyê xistin |
| **-bi paş ve dayîn** | cardin lê vegerandin |
| **-paş baranê ga cil kirin** | piştî bûyerê lez dan xwe |
| **paşbend** | 1. ji dawiyê ber bi destpêkê; çep 2. paşgir *"kitêba meriyan, paşbendî tê xwendin" |
| **paşberek** | di şeran de eniya ku li paşiyê disekine |
| **paşbêj** | kesê ku kurtepistan digerîne |
| **paşbêjî** | kurtepist |
| **paşdeman** | pêşdeneçûn |
| **paşdir** | segê har |
| **paşe** | 1. torin 2. desthilat*"kereng tên ji kaşan, xwarina ker û cehşan çi dike li mala paşeyan" |
| **paşepêl** | dijî aliyê rast |
| **-paşepêl siwar bûn** | berê xwe dan boçika sewalê û pişta xwe dan sêrê wê |
| **-(kincek) paşepêl li xwe kirin** | aliyê piştê dan pêşiyê, ê pêşiyê jî dan piştê û wisa li xwe kirin |
| **paşgir** | (r) qertafa ku tê dawiya peyvan wek: mêranî, razdar, cengawer...; paşpirtik, paşbend |
| **paşgo** | pêvek, îlawe |
| **paşgotin** | 1. gotina dawiyê2. kurtepist |
| **paşil** | 1. paxil 2. hembêz3. cêba paşilê *"destê dizan naçe paşilê" |
| **-di paşila xwe de xwedî kirin** | jê hez kirin û bi her awayî parastin |
| **paşil bûn** | 1. hamile bûn, ducanî bûn 2. xwe spartin yekî û di bin mineta wî de man |
| **paşî** | dawî |
| **paşîn** | 1. a/ê hera/herî dawiyê2. axirî |
| **-cara paşîn** | sefera dawiye, qola axiriyê |
| **paşîv** | 1. di sahûra rojiyê de danê xwarinê 2. xwarina danê nîvê şevê |
| **paşling** | 1. feşk, pêxem 2. pêavêtinber |

| | |
|---|---|
| **paşmîr** | kizîr |
| **paşpenî** | dema ku kesek ne li cihê xwe be |
| **-biryara di paşpeniyê de** | di dadgehê de darizandina kesekî bêyî ku ew li wir be |
| **paşpê** | dijî îstiqameta asayî |
| **paşpêkî** | dijayetiya aliyê asayî |
| -**paşpêkî meşîn** | pişta xwe dan îstiqameta aliyê çûnê û wisa meşîn |
| **-paşpêkî siwar bûn** | berê xwe nedan aliyê çûyînê û wisa siwar bûn |
| **paşnav** | 1. navê malbatê ê ku pê tê nasîn 2. leqeb |
| **paşstû** | katara stûyî |
| **paşteng** | qûşa ku davêjin dawiya palanê keran da ku di serejêran de bi ser re neşimite |
| **paşveçûn** | 1. şundeman2. vegerîn |
| **paşverû** | xêrnexwaz |
| **paşvexistin** | eglekirin |
| **paşwer** | 1. kesê ku li pey tê 2. serokê ku cihê serokê berê digire |
| **paşwerî** | serokatiya çend kesan a li pey hev |
| **pata** | 1. wekhev 2. fît |
| **pata bûn** | 1. wekhev bûn2. fît bûn |
| **patal** | xirdik, qamkinik |
| **patalî** | xirdiktî, qamkiniktî |
| **pate [I]** | silav |
| **-pate lê xistin** | silav dan |
| **pate [II]** | pîne |
| **-pate kirin** | pîne kirin |
| **patexur** | 1. xwefiroş2. darê destê neyaran |
| **patêk** | paçik, deste |
| **-patêkek pere** | tomarek dirav |
| **-patêk bi patêk keys kirin** | deste bi deste dan ser hev |

| | |
|---|---|
| **patik** | paşstû, şatik |
| **patile** | cureyekî nên e |
| **patîle** | çavdêrî |
| **patox** | mêweya xerabûyî |
| **patpatik** | tiving û demançeyên zarokan a ku pê dilîzin, teqteqok |
| **patrome** | lûl, fetrûm |
| **patrome kirin** | lûl kirin, fetrûm kirin |
| **paverîng** | mêweyên ku bi emadê xwe ji darê rijiyane erdê |
| **pawan [I]** | 1. panêr 2. bendewar |
| **pawan [II]** | çêregeha taybet |
| **pawan [III]** | gerandina kar û baran bi awayekî navendî; rejî |
| **pawankar** | kesê ku gerandina kar û baran ji bilî xwe nade kesî; rejîkar |
| **pawankarî** | rejîkarî, karê ku ji aliyê komekê tenê ve tê gerandin |
| **-pawankariya bazirganî** | kar û barên ticarî yên ji aliyê komikeke berjewendîparêz ve |
| **pax** | hesta tirsê a domdar |
| **paxav [I]** | metirsî, fikar |
| **paxav [II]** | qîm û qedrdanî |
| **-paxav (pê) kirin** | qîm pê anîn, pê qayîl bûn |
| **paxil** | 1. paşil 2. hembêz*“destê wî, rast naçe paxila wî” |
| **paye** | 1. rutbe, raye 2. rûmet 3. pile |
| **payeberz/payebilind** | rayedarê bilind |
| **payeberz/payebilind bûn** | rutbeyeke ji a berê zêdetir wergirtin |
| **payedar** | 1. rayedar 2. mandî, nemir |
| **payetext** | bajarê sereke yê rêvebiriya welêt; serbajar |
| **payîn/dipê/bipê** | 1. çav li rê bûn 2. li bendê man3. raçav kirin |
| **payîz** | demsala beriya zivistanê*“bihar hate rakirin, |
| **payiz** | hate dakirin” |

| | |
|---|---|
| **payîze** | cureyekî genimê ku tovê wî payîzê tê reşandin |
| **payal** | talan |
| **paymal kirin** | talan kirin |
| **paytext** | payetext |
| **pazdeh** | 1. hejmara beriya şazdehan û piştî çardehan2. jimareya 15’an*“ji gotinê heta kirinê, pazdeh sal hene” |
| **pazdehem** | (-în) di rêza pazdehan de |
| **pazen** | pîneyê pemboyîn |
| **pazne** | heyveron |
| **peder** | bav |
| **pederşahî** | baviksalarî |
| **pegr** | dûrd |
| **pegrandin/di pegrîne/ bipegrîne** | di tiştên avî de unsurên giran daxistin jêrê |
| **pehîn** | lêdana bi piyan |
| **-pehîn avêtin** | bi piyan lê xistin |
| **pehn** | 1. rast 2. meht 3. tehtevêlkî |
| **pehnî/pehna yî** | 1. rastayî2. mehtî |
| **pehn bûn** | 1. meht bûn 2. pelçiqîn |
| **pehn kirin** | 1. meht kirin2. pelçiqandin |
| **pehtin/dipêj e/bipêje** | 1. ji xwarinê re amade kirin2. pijandin 3. stewandin*“temûz dipêje, tebax dirêje” |
| **pejirandin/di bejirîne/ bipejirîne** | 1. qebûl kirin2. çespandin |
| **pejirîn/dipeji re/bipejire** | 1. qebûl bûn 2. çespîn |
| **pejk** | çilka bijiyayî |
| **pejilandin/di pejilîne/ bipejilîne** | 1. hilweşandin2. wêran kirin |
| **pejilîn/dipejil e/bipejile** | 1. hilweşîn 2. wêran bûn |

| | |
|---|---|
| **pejinandin/dipejinîne/bipejinîne** | kesaxtin |
| **pejmûrde** | 1. jihevdeketî2. perîşan, şerpeze |
| **pejn** | pêjn |
| **pekandin/dipekîne/bipekîne** | 1. pengizandin2. firandin 3. derew kirin |
| **-jê pekandin** | 1. dexesî lê kirin 2. jê behicîn |
| **pekîn/dipeke/bipeke** | 1. pengizîn 2. baz dan3. firîn |
| **pekîner** | 1. zirzop 2. jiberavêj |
| **pel [I]** | 1. per 2. rûpel 3. belçik *“pelên darê, darê dixemilînin” |
| **pel [II]** | car, teql, qol |
| **-pel xwarin** | gon xwarin |
| **pelandin/dipelîne/bipelîne** | 1. teselî kirin 2. temasî lê kirin 3. miz dan |
| **pelaş** | 1. giyayê bêkêr; pûş2. kewaşe |
| **-pelaş kirin** | kewaşe kirin |
| **pelate** | 1. belav 2. belawela |
| **pelax** | çêreya hişkbûyî |
| **pelaxtin/dipelixîne/bipelixîne** | 1. bi ser hev de tewandin û pelçiqandin2. dewixandin û hûrî ser hev kirin |
| **pelçim** | belçik |
| **peldank** | 1. rûpeldank 2. diravdank |
| **pele** | lez |
| **pele kirin** | lez kirin |
| **pelemar** | 1. firsenda demdemî ya ku her carê bi dest nakeve 2. êrîş |
| **pelemar dan** | êriş kirin |
| **pelendar** | 1. çoyê darînî an jî ji lekê yê ku hêzên ewlehiyê bi kar tînin û bi kêrî lêdanê tê 2. fîşenga ronîker a ku ji bo kifşkirina hedefê tê teqandin |
| **pelg** | cureyekî daran e*”sîbera pelgê, ne ji bo xwe ne ji bo xelqê” |

| | |
|---|---|
| **pelije** | qismet, nesîb |
| **pelijîn/dipelij e/bipelije** | 1. bizivîn 2. xebitîn |
| **pelisandin/di pelisîne/ bipelisîne** | 1. hûr kirin2. çînîn |
| **pelişandin/di pelişîne/ bipelişîne** | hilweşandin, rûxandin |
| **pelişîn/dipeli şe/bipelişe** | 1. tev dan, tev li hev kirin 2. hilweşîn, rûxîn |
| **-pelişîn hev** | hilperikîn hev û li hev xistin |
| **pelişqe** | 1. pûç 2. kevin û peritî |
| **pelişqe bûn** | 1. pûç bûn2. kevin bûn û peritîn |
| **pelixandin/di pelixîne/ bipelixîne** | pelaxtin |
| **pelixîn/dipeli xe/bipelixe** | 1. bi ser hev de tewîn û pelçiqîn 2. dewixîn û hûrî ser hev bûn |
| **pelîd** | 1. nebaş 2. îblîs, şeytan |
| **pelîdî** | şeytanî |
| **pelîka** | behane, hincet |
| **pelîn** | tiştê ji pelan çêbûye |
| **pelîse** | pelije, qismet |
| **pelp** | pelîka |
| **pelpût kirin** | 1. eyb bi derewan veşartin 2. derew pîne kirin |
| **pelû** | kanikên çavan |
| **pelûl** | pelûrê ku bi doşavê hatiye çêkirin |
| **pelûr** | xwarinên ku zêde pijiyane û êdî şibihîne hêvîr |
| **pembo** | çêreyeke cihên avî ye û jê qumaş û pîne tên bidestxistin |
| **pemboyîn** | pînê û pirtiyê ku ji pemboyî çebûye |
| **pena** | 1. hawar 2. daxwaz3. hêvî |
| **penaber** | kesê ku hawara xwe digihîne welat, alî an jî kesekî da ku jiyana wî ji belayê bê parastin; koçberê bêwar, multecî |

| | |
|---|---|
| **penaberî** | îltica, koçberî |
| **penah** | îltica, koçberî |
| **penahgeh** | 1. cih an jî welatê ku penaberan dihewînin2. wargeha penaberan |
| **penaxwaz** | kesê ku hewandinê ji aliyekî dixwaze |
| **penc** | lepê dirindeyan |
| **-penc kirin** | bi pencikan lê xistin penceşêr şêrpence |
| **pencik** | neynûkên ajalên wekî se, gur, pisîk û hwd |
| **pencirûk** | erîşa bi neynûkan |
| **-bi pencirûkan li qûna xwe ba ketin** | ji kirina xwe poşman bûn û beriya xelqê nefsa xwe ceza kirin |
| **pend** | 1. nesîhet, şîret 2. gilok *"pend pendên cenabê Mûsa ne, fêl fêlên gorgorê firewin in" |
| **-pend dan** | şîret kirin |
| **pendî** | xuya, diyar |
| **peng** | sekinî û neherikbar |
| **pengav** | 1. lîtav, avherî, herîrêtik 2. cihê ku av lê hildipengire |
| **pengirîn/dipengire/bipengire** | **1**. (av) gol bûn û fûrîn 2. (endamê êşiyayî, şkiyayî û hwd) xwîn tê de reş bûn û werimîn |
| **pengivandin/dipengivîne/bipengivîne** | (av) dan sekinandin û kişana wê dan astengkirin |
| **pengivî** | ava sekinî û nekişiyayî |
| **pengivîn/dipengive/bipengive** | (av) sekinîn û nekişîn |
| **pengizandin/dipengizîne/bipengizîne** | 1. hilfirandin2. hilpekandin |
| **pengizîn/dipengize/bipengize** | **1**. hilfirîn 2. hilpekîn |
| **pengîn/dipenge/bipenge** | (tiştê avî) kom bûn |

| | |
|---|---|
| **penî** | 1. pişt 2. xuya 3. bêdeng |
| **penîr** | adaneke şîrê nekelandî yê havênkirî ye |
| **pep/pepik** | 1. (di zimanê zarokan de) pê 2. (di zimanê zarokan de) sol an jî gore |
| **pepûk** | 1. cureyekî çivîkan e û dike qebeqeb 2. bêkes û belengaz |
| **-pepûkê!** | belengazê, bêkesê! |
| **-pepûko!** | belengazo, bêkeso! |
| **peqandin/dipeqîne/bipeqîne** | tiştên nepixî teqandin |
| **peqijîn/dipeqije/bipeqije** | xwe bi xwe peqîn |
| **peqijok** | peqpeqokên sirûştî |
| **peqîn/dipeqe/bipeqe** | **1**. bişkuvîn 2. bişku vebûn*“gul li gulê dinêre û dipeqe” |
| **peqpeq** | cihê werimî yê bi kêm û amas |
| **peqpeqok** | 1. gogikên ku bi ser ava pir kelyayî û kefa sabûnê dikevin 2. peqpeq |
| **per** | 1. rûpel 2. bask 3. pel û pot 4. belg *“ecelê gêrikê tê, per û baskên wê hêşîn dibin” |
| **-per û bask pê ve hatin** | pir şa û kêfxweş bûn |
| **perandin/diperîne/biperîne** | **1**. derbas kirin2. bi dest xistin perasî parsî |
| **peraş** | 1. giya û dara ku şax û belçikên wan pir in2. elokê ku xwe digijgijîne*“dara peraş, siya wê jî fireh e” |
| **-peraş dan** | 1. şax û guçil dan 2. gijgijandin |
| **-peraş kirin** | 1. şax vedan2. gijgijandin 3. veperimandin |
| **perat** | sermaya hişk; hişkî |
| **perav** | 1. bejahiya li kêleka aviyekê 2. pêlên avê Percîs gerestêrkek e |
| **perç/perçaf** | werm |
| **perçem** | 1. nîşaneye ser-xwebûna gelekî; ala 2. navçavik 3. tûncik |
| **perçifandin/diperçifîne/biperçifîne** | 1. werimandin2. xwe qure kirin û rikê xwe anîn |

| | |
|---|---|
| **perçifîn/dipe rçife/biperçif e** | **1**. werimîn 2. qure û hêrshatî bûn |
| **perçiqandin/ diperçiqîne/ biperçiqîne** | pelixandin û vîrçoqî kirin |
| **perçiqîn/dip erçiqe/biper çiqe** | pelixîn û vîrçoqî bûn |
| **perçîn** | 1. alava ku kaxezan bi derziyên xwe yên taybet ve hev ve dike 2. parçeyê xurtkirina tiştê lawaz |
| **-perçîn kirin** | 1. bi derziyên perçînê kaxez û hwd bi hev ve kirin 2. bi parçeyekî tiştek xurt û qayîm kirin |
| **perdax [I]** | îskana avê û çayê |
| **perdax [II]** | çirûsandin |
| **-perdax kirin** | çirûsandin |
| **perde** | 1. pîneyê tenik ê ku di malan de li ber paceyan ve dadiliqînin 2. di şanoyê de birên lîstikê |
| **-perdeya parastinê** | di alavên dîtbarî de pergala berevaniyê |
| **pere** | dirav *“ji pereyan şirîntir, dîsa pere ye” |
| **perehiz** | keyso |
| **pereng** | kuzotî û bizot |
| **-perest** | paşgirek e û wateya jêhezkirin, îbadetkirin û parastinê dide peyvê |
| **perestgeh** | cihê îbadetê; mabed |
| **perestin/dip erêse/biperê se** | **1**. îbadet kirin2. jê hez kirin 3. nokerî kirin |
| **perg** | 1. dûrd 2. bendesol |
| **pergal** | 1. nîzam 2. alav, amûr |
| **-pergala cîhanê ya nû** | nîzama teze a dinyayê |
| **-pergal rakirin** | mal talan kirin û şop li dewsa xwe nehiştin |
| **pergar** | 1. nexşeya avakirinê2. alavên pêwist ên çêkirin, tûjkirin, girêdan û hwd |

| | |
|---|---|
| **pergeh** | iroşgeha pergalên nivîsînê wek kaxez, pênûs, lênûsk, jêbir û hwd |
| **perger** | alaveke pîvandina nîvçemberê ye |
| **pergihandin/dipergihîne/bipergihîne** | 1. pêçan2. destedesteyî dan ser hev 3. bi keys kirin |
| **perginde** | 1. belavbûyî 2. peritî 3. derbider |
| **perginde bûn** | 1. belav bûn 2. peritîn 3. derbider bûn |
| **perginde kirin** | 1. belav kirin 2. peritandin 3. derbider kirin |
| **pergî** | xavik û postikekê şefaf ê ku li ser nebat û endamên hesas û tenik tê dîtin |
| **perik** | 1. rûpelên biçûk 2. baskên firindeyên biçûk3. kaxezên pêçana baçikan |
| **perisandin/diperisîne/biperisîne** | 1. pêş ve birin2. kemilandin |
| **perisîn/diperise/biperise** | **1**. pêş ve çûn 2. kemilîn |
| **perişt** | ezperest |
| **periştin/diperişîne/biperişîne** | teselî kirin û temtêl dahûrandin |
| **peritandin/diperitîne/biperitîne** | 1. kevn kirin2. rûçikandin 3. kelekût kirin, pir lê dan |
| **peritîn/diperite/biperite** | **1**. kevn bûn 2. ji ber kevniyê qetîn 3. qefilîn4. rûçikîn |
| **perixandin/diperixîne/biperixîne** | miz dan |
| **perî [I]** | cihê taybet ê ku ji bo bûka teze hatiye perdekirin û xemilandin |
| **perî [II]** | perwane |
| **perî [III]** | tîroj |
| **perî [IV]** | jina şox û ciwan; zerî *“ji weliyan perî, ji periyan xwelî” |
| **perî [V]** | cina hera bedew |
| **perî [VI]** | belavbûn |
| **-perî dan** | silikîn |

| | |
|---|---|
| **perandin/diperîne/biperîne** | **1**. (mirov) sewalê nêr berdan ser sewala mê 2. (qebrax) mêr berdan ser qûnekan |
| **perîn/dipere/bipere** | 1. (sewalê nêr) baz dan ser(sewala mê) 2. wekî sewalan tûşî jinan bûn |
| **perîşan** | 1. kesê ku di halekî ne tu hal de ye; pejmûrde 2. belengaz3. kepaze |
| **perîşan bûn** | 1. pejmûrde bûn 2. belengaz bûn 3. kepaze bûn |
| **perîşanî** | 1. pejmûrdetî 2. belengazî 3. kepazetî |
| **perîşan kirin** | 1. pejmûrde kirin 2. belengaz kirin3. kepaze kirin |
| **perîzade** | 1.jina nazdar a ji nifşê periyan 2. cureyekî nexweşiya ku gerdenê diwerimîne |
| **perjan** | perjîn |
| **perjîn** | dîwarê darînî yê ku didine nava avahiyekî |
| **perjîn kirin** | (ji bo parastina ji ziyanan) li dora bîstan, bax û hwd sûr jenîn |
| **permalî** | sewalên bibask ên malê |
| **permêw** | belgê dara mêweyê |
| **pero** | 1. pîne 2. pirtî |
| **perok** | 1. pero 2. nexweşiya dirmdar |
| **perokî** | kes, tiştê an jî cihê ku nexweşiya dirmdar bijiniyê |
| **perokî bûn** | tûşî nexweşiyeke dirmdar hatin |
| **perokî kirin** | nexweşiyeke dirmdar bijinandin ke, tişt an jî cihekî |
| **peroşî** | heyecan, coşî |
| **peroşmend** | kesê bi heyecan û kelegerm |
| **perperok** | cureyekî bihukên firinde ye; kerkene, belbelîtank |
| **perpût** | 1. bizdiyayî 2. peritî |
| **perpût kirin** | 1. bizdandin û aciz kirin 2. lê dan û peritandin |
| **perpitîn/dipe rpite/biperpi te** | 1. qirqilîn 2. vegevizîn |
| **perseng** | 1. pîvan 2. pîvana bi qasî 15 kîlometroyî |
| **-persenga devê xwe zanîn** | endazeya tixûbê xwe zanîn û li gorî wê tev gerîn |
| **persîv** | nezle, çilmas |
| **pert** | 1. tiştê nas û li pir de ran heyî; bêserûber 2. tewş |

| | |
|---|---|
| **pertaf** | salixên bifort û nepixandî |
| **pertaf kirin** | salixên bi fort û nepixandî vegotin |
| **pertal** | têkberên kevnekotik |
| **pertav [I]** | tîj, tîroj |
| **pertav [II]** | taqet, qeram |
| **-pertav tê de neman** | qudûm tê de neman |
| **pertav [III]** | pa û pesn, fort |
| **-pertavek dan xwe** | fortê xwe kirin |
| **perû** | 1. xelat 2. xişir û rêşiyên şûşeyî yên ku di dora çirayê de dadiliqînin |
| **-perû kirin** | xelat kirin |
| **perûk** | 1. kevnare 2. rûpûş3. pîne, pero |
| **perûkxane** | 1. saziya ku alavên dîrokî di pêşangeha xwe de radixe 2. karistana rûpûşan, firoşgeha rûpûşan |
| **perwa** | tirs û sehm |
| **perwane** | 1. perikên ku bi hêza ba, agir û gêrebayê dizivirin û hewayeke sar didine hundir an jî hewaya hundir a germ davêjin derve; bajen, baweşînk2. perperok |
| **-bûn perwane** | 1. li hev çûn û hatin 2. li dora hev zivirîn |
| **perwaz** | 1. firîn 2. çarçive |
| **perwazname** | 1. destûrname2. destûra firînê ya balafirekê 3. di malperê de rêbaza bikaranînê |
| **perwer** | hezkirî û parastî |
| **perwerî** | dilsojî |
| **perwerde** | 1. fêr 2. hînbûn |
| **perwerdehî** | 1. amojkarî2. fêrkarî |
| **perwerdekar** | 1. amojkar2. fêrkar |
| **perwerde kirin** | 1. amojandin2. hîn kirin |
| **perwerdenas** | fêrnas |
| **Perwîn** | gerestêrkek e |
| **perzîn** | 1. çemedankê kaxez û nameyan 2. poste3. name |
| **pes** | pez |

| | |
|---|---|
| **pesar** | 1. dibûr, beroj 2. kaş û kerîş |
| **pesartin/dipesêre/bipesêre** | **1**. spartin 2. bi tiştekî xurt tiştekî lawaz destek kirin |
| **pesdeng** | dengê nizm |
| **pesdengî** | rewşa nizmiya dêng |
| **pesend** | 1. çesp 2. pejr |
| **pesend kirin** | 1. çespandin2. dan qebûlkirin |
| **pesibîn/dipesibe/bipesibe** | **1**. ber bi rûxîne ve çûn 2. li ser henceyekê bûn |
| **pesinandin/dipesinîne/ bipesinîne** | xwe qure kirin*"aş digere, qeraş xwe dipesinîne" |
| **pesn** | 1. nîşandana kar, xebat û kesayetiya mirovî; pa 2. fort, fors *"derew li biyaniyê, pesn li pîriyê" |
| **-pesna xwe dan** | fortê xwe avêtin |
| **-pesn dan** | 1. pa dan, medh kirin 2. fors kirin *"mala bavê min dûr bûya, min dê têr pesna wan bida" |
| **pest** | 1. pêkutî, zextî 2. tundî 2. giranî 3. givaştin |
| **pestandin/dipestîne/bipestîne** | giraniyek danîn ser û pê givaştin |
| **peste** | stranên sivik û bilez |
| **pestek** | qutik, kiras |
| **pestîl** | 1. bastêq 2. her tiştê ku wekî hêvîr hatiye strandin; helîse |
| **-kirin pestîl** | pelçiqandin |
| **pest kirin** | giranî dan ser |
| **peşar** | ramyarî, siyaset |
| **peşarî** | ramyar, siyasî |
| **peşarvan** | siyasetmedar, ramyar |
| **peşk [I]** | par, beş |
| **-peşk avêtin** | dabeş kirin, qurhe kişandin |

| | |
|---|---|
| **-peşk li gû ketin** | siûda bêxêr parê ketin |
| **peşk [II]** | çirûsk, holepît |
| **peşk [III]** | eynî, pişk |
| **peşkek** | 1. hinek 2. piçek |
| **peşkilîn/dipeşkile/bipeşkile** | (civîn, şahî û hwd) belav bûn |
| **peşm** | hirî |
| **peşmîn** | her tiştê ku ji hiriyê çêbûye |
| **peşûş** | 1. xilûxe 2. genijî û kirêt |
| **petixîn/dipetixe/bipetixe** | îflas kirin, malwêran bûn |
| **petî** | zelal û vawêrtî |
| **petî kirin** | 1. zelal kirin û vawêrtin 2. (ziman) peyvên biyanî jê avêtin |
| **petîx** | cureyekî berên bîstanan e, havînan dertê û nepijî tê xwarin |
| **petrome** | çikandina çiqilekî ter di dareke din a qelaştî an jî cerx kirî de |
| **petrome kirin** | çiqilê dareka ter di dareka din de bi cih kirin |
| **pev** | bi hev |
| **pevçûn** | şer û lihevxistin |
| **pevhatin** | lihevhatin, aştî |
| **pevketin** | belapêşkarî |
| **pevzeliqandin** | zeliqandina bi hev ve |
| **pexş** | weşan |
| **pexşan** | nivîsa asayî ya bi awayekî lihevhatî hatiye nivîsandin |
| **pexş kirin** | weşandin |
| **pey** | pişt |
| **-dan pey** | 1. li pişt çûn 2. lê gerîn 3. (da ku xwe bigihînê) hewl dan |
| **-ketin pey** | 1. şop gerandin2. (da ku xwe bigihînê) hewl dan |
| **peya [I]** | mêr, zilam |
| **-peyayê çargurçik** | mêrê mêrxas |

| | |
|---|---|
| **peya [II]** | peyar |
| **peya bûn** | 1. daketin jêrê2. nîştin |
| **peyak** | 1. peyar 2. di kişikê de leşkerên pêşmerge |
| **peya kirin** | 1. daxistin jêrê2. anîn xwarê |
| **peyam** | 1. agehî, xeber, salix2. pêxem |
| **peyamber** | 1. pêxember2. qasid, sefîr |
| **peyamnêr** | kesê ku peyamên buyerekê ji navendeke çapemeniyê re dişîne; nûçegihan |
| **peyamnêrî** | nûçegihanî |
| **peyandin/di peyîne/bipey îne** | 1. yek bi yekî/ dîmenguhêzekî dan payîn; lê telandin 2. ji bo karekî hewl dan |
| **peyar** | 1. peya 2. bê hesp*“her kî li hespê hevalan siwar e, herî peyar e” |
| **peyarê** | 1. riya taybet a peyaran2. di kêlekên kolanan de riya ku tenê peyar tê re diçin û tên |
| **peyatî** | meşa bi piyan |
| **peyde** | li ber çavan, xuya |
| **peyde bûn** | 1. çar bûn, pêk hatin, çêbûn 2. berdest bûn |
| **peyde kirin** | 1. çar kirin, pêk anîn, çêkirin 2. bi dest xistin |
| **peyderpey** | li dû hev |
| **peyivdar** | 1. gotarbêj 2. berdevk |
| **peyitandin/d ipeyitîne/ bipeyitîne** | 1. îsbat kirin2. pesend kirin |
| **peyivîn/dipe yive/bipeyiv e** | 1. xeber dan 2. axaftin 3. qise kirin *“bi qasî bejna xwe bipeyive” |
| **peyk** | 1. qasid 2. alava ku ji heyvê weşanê dike |
| **peyker** | mînakê mirov, ajal û hwd ên ji kevir, gêç, hesin, dar û hwd hatiye çêkirin; heykel |
| **peykersaz** | kesê ku ji bûjenan heykelan dadiroje; heykeltiraş |
| **peyman** | îtifaq, muahede |
| **-peymana civakî** | makezagon |

| | |
|---|---|
| **-peymana tomerî** | îtifaqa bikomasî |
| **-peyman girêdan** | îtifaq kirin, li hev kirin |
| **peyn** | 1. talaza gemara ajalan2. (da ku berên wan baştir bin) gemara ajalan an jî bûjena kîmyayî ya ku li zeviyan direşînin*"heçî deyn e, ew peyn e" |
| **pey re** | 1. pişt re 2. paşê |
| **peyrew** | 1. xelef, paşwer2. murîd |
| **peyrewî** | 1. xeleftî, paşwerî2. murîdî |
| **peyt** | îsbat û delîl |
| **peyv** | hemû gotinên watedar ên zimanekî; bêje, kelîme *"peyva xweş, bihara dilan e" |
| **-peyv darêjtin** | bêje saz kirin |
| **-peyv li peyvê sekinîn** | gotin hatin ser gotinê |
| **peyvdar** | berdevkê fermî yê dexgeheke mîrî an jî saziyekê |
| **peyvnasî** | (r) zanista ku cureyên bêjeyan diferisîne û jê re rêbazan datîne |
| **peywendî** | têkilî, eleqe |
| **peywir** | vatinî, wezîfe |
| **peywirdar** | 1. wezîfedar2. karmend |
| **peywirdar kirin** | wezîfedar kirin |
| **peywendî** | têkilî |
| **peyxam** | îlham |
| **pez** | mih û beran *"pezê nêr, ji kêrê re ye" |
| **-pez hate baniyan û xwir kete kebaniyan** | kar nêzîk bû û karker liviyan |
| **pezare** | derd, jan |
| **pezkovî** | bizina kovî |
| **pezîzank** | qurtik |
| **pezûdan** | spêdeya zû, elind, berbang |

| | |
|---|---|
| **pezvan** | kesê ku pêz xwedî dike |
| **pezvanî** | karê sexbêrkirina pêz |
| **pê [I]** | endamê ku li serê tê meşîn; pî |
| **-pê dan erdê** | heter kirin |
| **-pê li boça seyî kirin** | ket ber bextê bênamûsan |
| **pê [II]** | cînavka lihevxistî ya ku ji /bi wê-wî/ hatiye |
| **-pê de pê de** | 1. hêdî hêdî2. vir de û wê de |
| **-pê de ketin** | 1. pê re mijûl bûn 2. tê alîn |
| **-pê re** | 1. bi wî/wê re 2. di gel wî/wê |
| **pêbaz** | pireya peyaran |
| **pê bilîn** | 1. pê alîn 2. pê re egle bûn |
| **pêç** | pîneyê ku li endamê şkestî û birîndar tê alandin |
| **pêçan/dipêçe/bipêçe** | 1. paçik kirin 2. lê alandin |
| **pêçandin/dipêçîne/bipêçîne** | 1. paçik kirin 2. lê alandin |
| **pêçayî** | 1. paçik-kirî 2. alandî, dorpêçkirî |
| **pêçe** | çarçefa ku jinên misilman li xwe dipêçin |
| **pêçek** | qumaşê ku li zarokê nûbûyî tê alandin |
| **pêçik** | kaxeza paçik-kirinê |
| **pêçî** | tilî *"pêçiya ku neçe qulê, tişt pê venadin" |
| **pêçîn/dipêçe/bipêçe** | lê alîn |
| **pêçk** | tiştê ku li ser lûleyeke kinik hatiye alandin |
| **pêçke** | 1. taye, çerxe 2. toterîk |
| **pêçûlk** | erebokeke biçûk a ku zarokên viringî dikinê û bi dest dajon |
| **pêdanî** | alîkariya diravî |
| **pêderî** | çarçiveya dêrî |
| **pêdivî** | 1. pêwistî 2. lazimî |
| **pêdizkî** | meşa nermînga û teletel |
| **-pêdizkî çûn** | nermînga û teletel bi rê ve çûn |

| | |
|---|---|
| **pê ewle bûn** | pê ve emîn bûn |
| **pêgeh [I]** | meqam |
| **pêgeh [II]** | 1. qad 2. war3. herêm |
| **pêgeh [III]** | daşir, destşok |
| **pêger** | 1. qad 2. piyase |
| **-pêgera nêçîrvanan** | herêma nêçirê |
| **pêgermok** | çûn û hatina di qadekî de; gergemok |
| **-pêgermok gerandin** | ji serê qadekî heta serê din çûn û hatin |
| **pêgiran** | teral, selexane |
| **-pê girtin** | 1. bi alikariya tiştekî tiştekî din girtin2. lê peyde bûn |
| **pêgirtî** | 1. beng 2. peyrew |
| **pê hesandin** | 1. hişyar kirin2. agahdar kirin 3. hîn kirin |
| **pê hesîn** | 1. hîs kirin 2. zanîn3. hîn bûn *“agir pê keve jî pê nahese” |
| **pêhêl** | bihêl |
| **pêhin** | pehîn |
| **pêjandin/dipêjîne/bipêjîne** | pijandin |
| **pêjimêr** | alava ku pê hesab tên kirin; çortik |
| **pêjinkar** | bihîstiyar |
| **pêjn** | seda, deng, awaz |
| **-pêjna te nayê** | deng û awaz ji te dernayê |
| **-pêjna tiştekî kirin** | beriya bûyînê bi tiştekî hesîn |
| **pêkan** | mumkin |
| **pêk anîn** | 1. bal pê anîn 2. şiyan, karîn |
| **pêkenî** | 1. elewat 2. rêşkeniyê alemê *“gur pîr dibe, dibe pêkeniyê kûçikan” |
| **pê kenîn** | 1. bi yekî tiraneyê xwe kirin 2. ber bi yekî ve besimîn |
| **pêkenok** | laqirdî, tirane |
| **pêk hatin** | 1. bal pê hatin2. çêbûn, saz bûn |

| | |
|---|---|
| **pêkol** | 1. erdkolana sewalan a bi piyan 2. xwestin |
| **pêkol kirin** | 1. (sewal) bi piyan erd vekolan 2. (mirov) xwestin û heter ki rin |
| **pêkutî** | 1. zext û tundî 2. îsrar, heter |
| **pêk ve** | bi hev re |
| **pêkvejiyan** | heyata bi tevayî |
| **pêl [I]** | dem, qas |
| **pêl [II]** | lemperên zeryayê |
| **-pêl dan** | (zerya) lemper dan |
| **pêl [III]** | hilma bayî |
| **pêl [IV]** | rêjeya gihiştinê ya alavên ragihandinê |
| **pêlav** | sol *“kurmanc têr dixwe û li pêlava xwe digere” |
| **pêlawaz** | 1. di helbesta kevn de ristên arûzê 2. teql û kirpa gotinê |
| **pêlawazdar** | helbesta ku li gorî arûze hatiye ristin |
| **pêlawer** | kesê ku keştiyê dajo |
| **pêlekan** | silim, pêpelûk*“dinya pêlekan e, rabûn jî heye, peyabûn jî heye” |
| **pêlepaş** | paşepêl, paşpê |
| **pê lê kirin** | pêpest kirin |
| **pêlîstik/pêlîs tok** | tişt û miştên ku zarok pê baziyê dikin; tîtik |
| **pêlşikên** | dîwarê ku li ber lemperan dijenin da ku tundiya wan daxîne |
| **pêlweş** | 1. alava ku herka gêrebayê têkûz dike2. alava ku weşana ji peykê têkûz dike 3. îzgeh |
| **pênas(-e)** | tarîf, unwan |
| **-pênasa neteweyî** | çarçiveya ku gelekî dinimîne |
| **pênc** | 1. hejmara piştî çaran û beriya şeşan 2. jimareya5’an |
| **pêncek** | 1. ji pênc paran parek 2. ji pênc paran pareke xenîmetê ya ku aîdî Ehlibeytê ye |
| **pêncem(-în)** | di rêza pêncan de |
| **pêncî** | 1. deh heb pênc 2. jimareya 50’î |
| **pêncgoşe** | şeklê ku pênc guçê wî hene |
| **pêncsed** | 1. pênc heb sed li ser hev 2. jimareya500’î |
| **pêncşem** | roja şeşan a hefteyê |

| | |
|---|---|
| **pêndav** | cureyekî şimaya ku mêşhingiv pê derê kunên xwe digirin û teng dikin da ku hingivên xwe ji germê, sermayê û bihukên dujmin biparêzin |
| **pêngav [I]** | navbera tu lingên vekirî; gav |
| **pêngav [II]** | pêşveçûna erênî |
| **pênivîs** | pênûs |
| **pênûs** | alava ku pê tê nivîsandin û xêzkirin; qelem |
| **pênûsdank** | dewsa qeleman; qelemdank |
| **pêpal** | yom, qudûş |
| **pêpalxêr** | biyom, biqudûş |
| **pêpehn** | kesê ku binê endamê wî yê meşînê riprast e |
| **pêpelûçka** | meşa li ser dest û çongan; çarlepîka |
| **pêpetî** | pêxas |
| **pêr** | roja beriya îro |
| **-bêhtir** | pêr bi qasî sê rojan beriya niha |
| **pêrar** | du sal berî niha |
| **-bêhtir pêrar** | sê sal berî niha |
| **pê rayî bûn** | ecibandin |
| **pêrbest** | gihanek |
| **pergîn** | 1. rasthatin 2. pêşeroj |
| **pêrginandin/ diperginîne/ biperginîne** | mazûvanî kirin |
| **pêrgî hev hatin** | rastî hev hatin, liqayî hev hatin |
| **pêrgîngeh** | hêwana rawestinê |
| **pêrgînî** | 1. pêşwazî 2. bixêrhatinî |
| **pêrgînî kirin** | 1. pêşwazî kirin 2. bixêrhatina yekî kirin |
| **pêrist** | agahiya ku naveroka berhemê bi riya sernavan nîşan dide û di destpêk an jî dawiya pirtûkan de tê bicihkirin |
| **pêsî** | kûtî |
| **pêsîr** | sîng *"dinya pêsîra diyan e, her xwe dixwe" |
| **pêsîrbend** | berdank |
| **pêsotk** | cureyekî nexweşiya harbûnê ye |

| | |
|---|---|
| **pêsotkî** | kesê ku bi nexweşiya harbûnê ketiye û xwe vediçirikîne |
| **pêstirk** | qutaf |
| **pêstirk girtin** | qutifîn |
| **pêş [I]** | 1. ber û ne li paş2. hember, dij *“bi darê zorê, tu tişt nayê pêş” |
| **pêş [II]** | 1. daw 2. qûntar |
| **pêşan** | nîşandan |
| **-pêşan dan** | nîşan dan |
| **pêşangeh** | cihê ku ji bo bîneran nimûne lê tên raxistin |
| **pêşanî** | yekemî, ewilî |
| **pêşbazî** | pêşbirk, reqabet |
| **pêşber** | 1. hember 2. pêşpal |
| **-anîn pêşberî hev** | hevrû kirin |
| **pêşberek** | di şeran de eniya ku li pêş þer dike |
| **pêşbirk** | ji bo qezenckirina tiştekî reqabeta bi hinekan re; pêşbazî |
| **pêşbîn** | zanayê ku pêşerojê li gorî daneyên heyî texmîn dike; dûrebîn |
| **pêşbînî** | dûrebînî |
| **pêşbînî kirin** | bi riya daneyên berdest pêşeroj texmîn kirin û xwe li gorî vê yekê amade kirin |
| **pêşcênîk** | enî, pêşnehtik |
| **pêşçav** | berçav |
| **pêşçav kirin** | berçav kirin |
| **pêşdank** | pêşgir |
| **pêşdaraz** | -bêyî ku rastiya karekî binase- kesê ku hê di sêrî de qerara xwe dide |
| **pêşdarazî** | di pêş de biryardan |
| **pêşdem** | karê ku berî dema texmînkirî an jî diyarkirî pêk tê; berwext |
| **pêşdîtin** | derpêşkirin |
| **pêşdîtinî** | feraset |
| **pêşek** | pêşeng |
| **pêşeng** | 1. pêşewa 2. serwer3. serpêşsen |
| **pêşgir [I]** | (r) qertafên ku tên pêşiya bêjeyan |
| **pêşgir [II]** | mendîla ziwakirina ser û çavan |
| **pêşgotin** | sergotar |

| | |
|---|---|
| **pêşiya** | nanê tenûrê |
| **pêşî [I]** | mêş, spêle *"hêlîna pêşiyan, çênabe" |
| **pêşî [II]** | bav û kal, ecdad |
| **pêşî [III]** | aliyê xuyayî |
| **-pêşî mişt û paşî di gû de hişt** | aliyê xuyayî maliştin û aliyê veşartî di nav gemarê de hiştin |
| **pêşîn** | 1. yekemîn, ewil2. dest bi dest *"bextê pêşîn, warê hêşîn" |
| **pêşînî** | diravê ku beriya wergirtina asûkekê tê dayîn an jî standin |
| **pêşkarî hev bûn** | ketin pêsîra hev û şer kirin |
| **pêşkeftin** | 1. geşedan 2. serkeftin |
| **pêşkêş kirin** | 1. teqdîm kirin, pêşandan 2. araste kirin, rapeşan |
| **pêşkêşkar** | 1. arastekar2. pêşandêr |
| **pêşmal** | werisên ku konî bi singên pêşiyê ve girêdidin |
| **pêşmalk** | 1. bervank 2. pêşmal |
| **pêşmerge** | 1. cangorî, fedayî2. şervan |
| **pêşniyar** | pêşkêşkirina ramanekê beriya destpêkirina karî; teklîf |
| **-pêşniyara aştiyane** | teklîfa ku ji bo mebestên aştiyê tê pêşkêşkirin |
| **pêşniyar kirin** | teklîf kirin |
| **pêşniyarnam e** | teklîfa nivîskî |
| **pêşniyaz** | pêşniyar, teklîf |
| **pêşnûma** | bernameya sêwirandî |
| **-pêşnûma kirin** | bername saz kirin; sêwirandin |
| **pêşpirtik** | pêşgir |
| **pêşrew** | 1. kesê ku ne peyrew e 2. bihûrî û çûyî |
| **pêşûle** | cureyekî çivîkên mêşxur e |
| **pêşûş** | genî û kêrnehatî |
| **pêşverû** | kesê ku rû û ber ê wî ber bi pêşerojeke geş e û ne paşverû ye |
| **pêşwazî** | mazûvanî, pêrgîn |

| | |
|---|---|
| **pêşwazî kirin** | 1. mazûvanî kirin, pêrginandin 2. mêvan kirin |
| **pêşwext** | pêşdem |
| **pêt** | 1. rengzer 2. alafa êgir; rivîn 3. pihêt, qayîm |
| **pêtazî** | pêxwas |
| **pêto** | quzfiroş, deyûs |
| **pê vedan** | (mêş, mar û hwd) lê dan *“hin hingiv dixwin û mêş bi hinekên din vedidin” |
| **pêvek** | îlawe |
| **pêvajo** | dema bûyerê a ku tê de diqewime; domana demê |
| **pêwan** | pasevanê bendîxaneyê; zêravan |
| **pêwendî** | têkilî, eleqe |
| **-pêwendiyên civakî** | têkiliyên di navbera civakê de |
| **-pêwendiyên navneteweyî** | têkiliyên di navbera neteweyên cîhanê de |
| **pêwendîdar** | têkildar, eleqedar |
| **pêwendî saz kirin** | têkilî danîn, eleqedar bûn |
| **Pêwir [I]** | gerestêrkek e |
| **pêwir [II]** | nexweşiya kêmdengiyê |
| **pêwist** | lazim, hewce |
| **pêwistî** | pêdivî, hewcetî |
| **pêxas** | 1. bêsol û bêgore2. xizan 3. (sewal) bênal |
| **pêxas bûn** | 1. bêsol û bêgore bûn 2. xizan bûn 3. (sewal) bênal bûn *“hespê çê, bila pêxas be” |
| **pêxas kirin** | 1. bêsol û bêgore kirin 2. xizan kirin3. (sewal) bênal kirin |
| **pêxem** | feşk û astengî |
| **-pêxem lê xistin** | feşk lê xistin û astengîdan ber |
| **pêxember** | hilgirê nameya pîroz û hinartiyê Xwedê ji bo çaksaziya mirovahiyê |
| **pêxembertî** | karê ku pêxemberên Xwedê pê radibin |
| **pê xistin** | agir dadan/hilkirin |
| **pêxistî** | dadayî *“çiraya her kesî, pêxistî namîne heta sibehê” |
| **pêxwarin** | ji bilî nanê tisî her tiştê ku bi nên tê xwarin |

| | |
|---|---|
| **pêzan** | zana û pisporê wî îşî |
| **piç** | 1. pir hindik 2. parçeyeke biçûk *“piç bi piç xwe gihand guç” |
| **-piçek** | hindikek |
| **piçêx** | para biçûçik |
| **piçikandin/dipiçikîne/ bipiçikîne** | 1. li hev alandin2. nexweşiyê (endamên cendêk) şileke kirin |
| **piçikîn/dipiçike/bipiçike** | 1. li hev alîn 2. (endamên cendêk) şileke bûn |
| **piçpiçî** | parçeyên pir hûrik |
| **piçpiçî kirin** | pir hûrik parçe kirin |
| **piçudank** | di zikê jinan/ mêzayan de dewsa zarokê/ têjikê; malzarok |
| **pidû** | goşte ku diran tê de çikandî ne; pirî |
| **pif** | ba û dengê berdana henaseyê |
| **-pifî guhan kirin** | 1. dizîka jê re gotin 2. nav tê dan |
| **pif kirin** | 1. nepixandin, perçifandin, werimandin2. damirandin 3. sar kirin |
| **pifdank** | nepox |
| **-pifdanka** | mîzê mîzildank |
| **pifo** | (di zimanê zarokan de) xurek |
| **pihêt** | muhkem û þidiyayî |
| **pijandin/dipijîne/bipijîne** | 1. pehtin 2. stewandin |
| **pijiqandin/dipijiqîne/ bipijiqîne** | fişkandin |
| **pijiqîn/dipijiqe/bipijiqe** | fiþkîn |
| **pijîn/dipije/bipije** | 1. stewîn 2. gihiþtin |
| **pijme** | bêhnijk |
| **pil** | sist |
| **-pil bûn** | sist bûn |
| **-pil kirin** | sist kirin |

| | |
|---|---|
| **pilav** | birincê di avê de kelandî |
| **pile** | 1. ast, rade 2. derece |
| **piling** | cureyekî sewalên dirinde ye û ji bilî sêrî dişibihe şêran |
| **pilor** | pelûr, malêz, çolik, hewdel |
| **pilox** | 1. bizota êgir 2. tiştê ku xwarina wî ji bo didan û pidûyan nerm e |
| **Pilte** | di find û fanosan de bendê ku agir pê digire |
| **-pilteya dil qetîn** | di heqê tiştekî an jî kesekî de bi fikar bûn |
| **Pilûr** | cureyekî sewalên çarpê ye |
| **Pilûsk** | 1. qulik 2. zenbele |
| **Pimpar** | çêreya ku nayê xwarin |
| **Pin** | raza taybet a ku her kes ji xwe re vedişêre |
| **Pinc** | tasik, legan |
| **Pincar** | çêreyên ku tên xwarin *“kalo memire bihar tê, pîrê memire pincar tê” |
| **Pind** | qûn, zûtik |
| **Pindam** | qirş û qeselên ku herka avê asteng dikin |
| **pindandin/di pindîne/ bipindîne** | axozî kirin |
| **Pinde** | axozî |
| **pindepîr** | pîrhevok |
| **pindiloşk** | 1. kurt û qelewok2. tombiz |
| **pindik** | 1. movik 2. kulîlk, xonçe |
| **pingil** | bizot |
| **pingav** | ava ku li cihekî col bûye |
| **pingirîn/dipi ngire/bipingi re** | 1. col bûn, bi ser hev de kom bûn 2. fûrîn |
| **pinî** | xasûk û çikûs |
| **pinîtî** | xasûktî û çikûsî |
| **pir** | 1. zêde 2. zehf 3. dengê ku paqijkirina difinî tê *“ez dengekî pir tehl dibihîzim, gelo tu dizanî ew çi deng e?” |
| **-pir û hindik** | kêm û zêde |

| | |
|---|---|
| **-pir kirin** | 1. zêde kirin 2. bêfil paqij kirin |
| **piranî** | 1. zêdehî 2. bi gelemperî |
| **piralî** | pirşaxî, pircelebî |
| **pirbêj** | kesê ku zêde diaxive; çelçelok *“derdowî |
| **pirbêj** | dibin, evîndar dengbêj dibin” |
| **pirç** | mû, pûrt |
| **-pirça xwe gij kirin** | mirûzê xwe tirş kirin |
| **pirçand** | xwediyê her cureyê çandê |
| **pirçandî** | rewþa sexbêriya her cureyê çandê pirçî bêmehde û rûtirş |
| **-xwe pirçî kirin** | xwe bêmehde û rûtirş kirin |
| **pird/pire** | navgîna du aliyên çem, newal û rûbaran*“hukimdar bibe pire jî, di ser re derbas mebe” |
| **pireh** | nûzayê ji dê bavên ku irqa wan ne wekhev e |
| **pirendazî** | di tevgerê de bihîstyariya derî tixûban; zêdegavî |
| **pirêze** | 1. qeselên zeviyê2. xozan *“me hêştir nedîtine li rêzê, qey me pişkul jî nedîtine li pirêzeyê” |
| **pirî [I]** | zêdehî |
| **pirî [II]** | goştê ku diran tê de çikandî ne; pidû |
| **pirîsk** | 1. misqal 2. zere, parçeyê biçûktirîn ê bûjenê |
| **pirkam** | nexweşê xwestekên nefsa xwe |
| **pirkamî** | nexweşiya daxwazên bêdawî |
| **pirole [I]** | teral |
| **pirole [II]** | 1. salixên lêzêdebûyî2. pertaf |
| **pirole kirin** | pertaf kirin |
| **pirpar** | pimpar |
| **pirpirok** | firfirok |
| **pirs** | 1. sual 2. arîþe 3. peyv *“mirov bi pirsê, diçe Xursê” |
| **-pirsên axretê li dinyayê pirsîn** | bersiva tiştên nedîtî û nebînayî xwestin |
| **pirsgeh** | di dezgeh û saziyan de nivîsgeha danasîn û ragihandinê |

| | |
|---|---|
| **pirsgirêk** | 1. arîşe 2. gelş |
| **-pirsgrêkên aborî** | arîşeyên têkildarî debara jiyanê |
| **-pirsgirêkên tenduristî** | arîşeyên têkildarî sihet û afiyetê |
| **pirsiyar** | 1. suwal 2. tehqîq |
| **pirsiyar kirin** | 1. sual kirin2. tehqîq kirin |
| **pirsîn/dipirse /bipirse** | 1. suwal kirin 2. jê bersiv xwestin *"bipirse ji kalê zemanan û xortê geriyayî" |
| **pirs kirin** | pirsîn |
| **pirsnîşan** | (r) di xalbendiyê de nîşaneya pirsê; (?) |
| **pirşeng** | çîk, pêt |
| **pirt** | parçe |
| **pirtepirt** | 1. dengê pêketin û damirîna êgir 2. dengê rajena dilî |
| **pirtepirt** | 1. (agir) geh pê ketin geh damirîn 2. (dil) geh bi tundî geh bi nizmî avêtin |
| **pirtik** | 1. parçeyê hûrik 2. pir kêm û hindik |
| **pirtikpirtikî** | parçeparçeyî, hûrhûrî |
| **pirtikpirtikî kirin** | parçeparçeyî kirin |
| **pirtî** | pîne û qumaş |
| **-pirtî û palaz** | cil û nivîn |
| **pirtû** | karê pîneçêkirin û dirûtinê |
| **pirtûk** | kitêb |
| **pirtûkfiroş** | kitêbfiroş |
| **pirtûkxane** | kitêbxane |
| **pirûsk** | hestiyê piştê |
| **pirxepirx/pir xînî** | kenê ji nişkê ve û bi dengî |
| **pirxepirx/pir xînî kirin** | ji nişkê ve û bi dengî kenîn |
| **pis** | kur *"neke bi kesan, dê bê serê te, ku neyê serê te, dê bê serê pisê pisan" |
| **pisepis** | dengê domdar ê baberçûnê |
| **pisepis kirin** | ba ji ber tiştekî nepixî çûn |

| | |
|---|---|
| **pisîk** | cureyekî ajalên malê ye û piranî ji bo ku mişkan bigire tê xwedîkirin |
| **pisîng** | pisîk *“devê pisîngê negihişt goştî, got: ‘min xêra dê û bavê xwe hişt” |
| **pismam** | kurap, kurmam |
| **pismet** | kurmet |
| **pispisandin/ dipispisîne/bipispisîne** | xwe egle kirin û fizirîn |
| **pispor** | 1. zanayê pîşeyekî2. xwendeyê di babeteke zanistî de *“ji xelqê re pispor e, ji xwe re kor e” |
| **pisporî** | zanyariya pîşeyî/ zanistî |
| **pist** | çêrmê mirovan |
| **pistepist** | pirkepirk, kurtepist |
| **pisxal** | kurxal |
| **pisxalet** | kurxaltî |
| **pisxaltî** | pisxalet |
| **pişaftin/dipişêve/bipişêve** | 1. tehrîf kirin û dirûv guherandin 2. di nav xwe de helandin û deng jê birandin |
| **pişartin/dipişêre/bipişêre** | pişirandin |
| **pişemasî** | cureyekî sewalên zeryayî ye |
| **pişêw** | tiştê servekirî û argo; mustehcen |
| **pişik** | kezeba spî; cerg |
| **pişikreş** | cureyekî nexweşiyan e |
| **pişikxerakirî** | kesê ku bi nexweşiya pişikreşê ketiye |
| **pişirandin/dipişirîne/ bipişirîne** | 1. (tiştê hişk) hûrik hûrik qut kirin 2. tiştek hûrî tev tiştekî din kirin |
| **pişirîn/dipişire/bipişire** | 1. (tiştê hişk) hûrhûrî bûn 2. (giyayê hişk) çilmisîn û hûrî erdê bûn3. hişk bûn daweşîn |
| **pişk [I]** | eynî, heman tişt, wekî wî *“destê dê, pişk ê qîzê ye” |
| **pişk [II]** | 1. beş 2. par |
| **-pişk kirin** | pareve kirin |
| **pişk [III]** | şilimziwa, qurhe, çîtik |
| **-pişk avêtin** | şilimziwa avêtin, qurhe kişandin |

| | |
|---|---|
| **pişkandin/di pişkîne/bipiş kîne** | bêhnijandin |
| **pişkdar** | 1. beşdar 2. hevalê parê, şirîk 3. hisedar |
| **pişkepişk** | dengê ku ji dev û bêvila kesê bahorî der tê |
| **pişkepişk kirin** | bêhnijîn |
| **pişkîn/dipişk e/bipişke** | bêhnijîn |
| **pişko** | 1. cemre, arzeba 2. bişku |
| **pişkul** | gemara pêz; bişkul |
| **pişo** | awayê bangkirina pisîkê |
| **pişopişo kirin** | 1. bangî pisîkê kirin 2. (karek) bi tika û lavayî dan kirin |
| **pişpişîn/dipiş pişe/bipişpiş e** | 1. (mirov) mirûzê xwe tirş kirin 2. (hevîr) hilpesirîn û tirş bûn |
| **pirûk** | cureyekî xwarina ku ji ardê savarî tê çêkirin |
| **pişt [I]** | 1. dawî 2. dûv 3. aliyê navmilê; qorik *"bavê mirovî, pişta mirovî ye" |
| **pişt [II]** | 1. aliyê ku di nêrîna pêşîn de xuya nabe; aliyê dûr 2. şala navê |
| **-pişt jê standin** | dorpêç kirin û eman nedan |
| **-li pişt dîwêr** | li aliyê dîwêr î din |
| **piştbend** | 1. bendê navê2. şala navê |
| **piştek** | spartek |
| **piştepiştî** | yekitî û komelayetî |
| **piştevan** | 1. destekar 2. tagir, alîgir |
| **piştek** | spartek |
| **piştepiştî** | yekitî û komelayetî |
| **piştevan** | 1. destekar 2. tagir, alîgir |
| **piştek** | spartek |
| **piştepiştî** | yekitî û komelayetî |
| **piştevan** | 1. destekar 2. tagir, alîgir |
| **piştevanî kirin** | 1. destek kirin 2. tagirî jê re kirin |

| | |
|---|---|
| **piştên** | şala navê |
| **piştgerm** | arxweyîn, bêminet |
| **piştgerm bûn** | arxweyîn û bêminet bûn |
| **piştgermî** | bêminetî |
| **piştgir** | 1. destekar 2. tagir3. hevpişt |
| **piştgirî** | 1. destekarî 2. hevalpiştî |
| **piştgirî kirin** | 1. destek kirin2. alîkarî kirin |
| **pişt girtin** | 1. destek kirin, yarmetî kirin 2. alî kirin, tagirî jê re kirin |
| **pişthotik** | kesê ku pişta wî weke hotikekî xwar bûye |
| **piştik** | bêrewişt û bêsinc |
| **piştî [I]** | barê li ser milan; barpişt, kolepiştî, şele, şixre |
| **piştî [II]** | jê şundetir |
| **-piştî nîvro** | ji nîvro şundetir |
| **piştkov** | pişthotik |
| **piştmêr** | mêrê alîkar ê di roja teng de |
| **piştperde** | rûyê nixumandî yê her tiştî |
| **-piştperdeya çalakiyê** | rûyê nixumandî yê karê birêxistinkirî |
| **piştrast** | kesê ku bawerî pê tê anîn; ewle |
| **piştrast bûn** | 1. ewle bûn, pê ve emîn bûn 2. dilniya bûn |
| **piştrast kirin** | 1. peyitandin2. dilniya kirin |
| **pişt re** | 1. pey re 2. paşê3. paran ve |
| **pit** | pitik |
| **pitepit** | axaftina nediyar |
| **pitepit kirin** | di guhên hev de tiştên nepen gotin |
| **pitê!** | baneşana ji bo keçan |
| **pitik** | zaroka qîzînî ya viringî*“hevalê kevn bibe neyarê nû, mirin di tûrikê pitê de ye” |
| **pitî** | biçûk û xweşik |
| **pitpitok** | mizmizok |
| **piv** | 1. dengê bayê ku ji cihekî teng derdikeve 2. (di zimanê zarokan de) tir |
| **piv kirin** | (di zimanê zarokan de) tir kirin |

| | |
|---|---|
| **pix** | dengê paqijkirina bêfilê |
| **pix kirin** | 1. (di zimanê zarokan de) bevil paqij kirin2. tirsandin |
| **pixtik** | xirdik |
| **pixtî** | xwîna ku bûye kerseng û wekî belxemê hev girtiye |
| **-bûn pixtî** | (xwîn) cemidîn |
| **pixtok** | cureyekî kevirê nerm û sivik e |
| **piyade** | peyar |
| **piyale** | lîwan, îskan, qedeh |
| **piyan** | 1. sinî, berkeşok 2. şerbikê avê |
| **piyar** | kesê bi merhemet |
| **piyarî** | merhemet |
| **piyase** | gera ser piyan a hêdî hêdî |
| **piyase kirin** | hêdî hêdî li ser piyan gerîn |
| **piz** | avika giyaneweran a ku di pizdankê de ruh hatiye ber; cenîn |
| **pizdank** | 1. di zik de cihê ku zarok an jî têjik tê de çêdibe 2. hevaloka ku piştî zayînê ji makê dikeve |
| **pizik** | pijikên ku di dema gêraniyê de derdikevin |
| **pizî** | di kincan de cihê ku doxînê tê re dikin |
| **pizînk** | zirmemikê ku didine devê zarokan da ku bitebitin |
| **pizîşk** | bijîşk |
| **pizrik** | pizik |
| **pizûr** | doran |
| **pî** | 1. endamê ji gûzekê berjertir2. (di hin devokan de) mil, pîl |
| **-li ser piyan** | ne rûniştî û şipê; çik |
| **pîceme** | kiras û derpiyê ku şevînî tên lixwekirin |
| **pîç** | 1. pûç 2. bîj |
| **pîçalk** | cureyekî çêreyê ye û pijandî tê xwarin |
| **pîj [I]** | 1. strî 2. dasî |
| **pîj [I]** | bîj |
| **pîjpîjî** | pir bi strî |
| **pîkol kirin** | (pez, dewar, ker û hesp) erd bi piyan kolan |
| **pîl [I]** | fîl |

| | |
|---|---|
| **pîl [II]** | ji enîşkê hetanî sermilê; sermil |
| **pîl [III]** | pola |
| **pîl [IV]** | parçeyeke kaxezî ya çargoşe û biçûk e, li ser aliyekî wê wêne û nivîs neqişandî ne, wekî giroveyeke fermî li belgenameyan û zerfên nameyan didin; pûl |
| **pîle** | pile |
| **pîlik** | 1. kesê ku di navbera malên bûk û zavayî de diçe û tê da ku karê şahiyê têkûz bike 2. posteger3. şûşeya ku ji bo zarokan şîr dikinê |
| **pîltan** | pir mezin; geltegan |
| **pîn/pînik [I]** | êwirgeha dîk, mirîşk û sewalên bibask ên din ên malê |
| **pîn [II]** | pehîn |
| **-pîn li tasa ber xwe xistin** | qîma xwe bi kar û rizqê hazir neanîn |
| **pînc** | 1. darikê sertûjkirî 2. sirkeya tewilandina sewalan3. darikê kêp î sertûjkirî |
| **-pîncê heram** | avika heram; zarokê zinayê |
| **-pînc lê xistin** | pêxem lê xistin, xilçik lê xistin, feşilandin |
| **pîne** | 1. qumaş, pirtî 2. parçeye qumêş ê ku pê cihê diriyayî û peritî tê tehmîrkirin *“kinca ku kete ber pîneyan, serê ku kete ber şîretan bi kêrî tiştekî nayên” |
| **-pîne kirin** | 1. pîneyek bi cihê diriyayî ve dirûtin2. eyb û derew veşartin |
| **pîp** | derdaneke mezin a devgirtî ye û ji bo bûjenên avî ji lajwerdê tê çêkirin û |
| **pîpik** | cureyekî zirneyan e û ji levenê tê çêkirin |
| **pîqask** | cureyekî çêreyê ye û nepijî tê xwarin |
| **pîr [I]** | 1. temendirêj 2. extiyar3. kal *“kevn e û pîr e, ji gotinan re bîr e” |
| **pîr [II]** | 1. pispor 2. serwext3. sergihayî |
| **pîr bûn** | 1. temendirej bûn 2. pîr bûn 3. (giya) gihiştin û qamir bûn *“dilê fireh, pîr nabe” |
| **pîraye** | arastek, çîçik |
| **pîrejin** | jina temendirêj |
| **pîrek** | 1. jin 2. jina mêrkirî*“zilam bi mû ye, pîrek bi rû ye” |
| **pîrelk** | cin |
| **pîrepizk** | 1. pîrejina temenbihurî ya ku êdî hal tê de nemaye 2. pîrejina xurifî 3. pîrejina cadûbaz |
| **pîrhevok** | cureyekî bihukên ku bi hûnandina tevnan ve navdar e; tevnepîrk |

| | |
|---|---|
| **pîrhevî** | 1. di çîrokan de pîrejinên cadûbaz, kirêt, qîldirêj ên ku li gêziyan siwar dibin, dengê kenîneke kirêt ji xwe tînin, zarokan didizin û ji xwe re dikin xizmetkar 2. pîrhevok |
| **pîrik** | 1. diyên dê û bavên mirovî 2. jina ku jinên ducanî diwelidîne 3. pîrhevok |
| **pîrî/pîrtî** | temendirêjî |
| **pîrmend** | şêwirmendê temendirêj û pispor |
| **pîrot** | kesê ku amanên ji kaxetîtan çêdike |
| **pîrotankî** | 1. (çêrm) biqerçûmek û virçiqî 2. (pidû) herişî û amasgirtî |
| **pîrotankî bûn** | 1. (çêrm) biqerçûmek û virçiqî bûn 2. (pidû) herişîn û amas girtin |
| **pîroz** | 1.muqedes 2. bimbarek |
| **pîrozbahî** | 1. muqedestî2. bimbarektî |
| **pîroze** | cureyekî gewherên giranbiha ye |
| **pîroz kirin** | bimbarek kirin |
| **pîrozname** | tebrîka nivîskî; tebrîkname |
| **pîrozwer** | 1. muqedes 2. bimbarek |
| **pîs** | kirêt |
| **pîsî** | gemara kûçik, beraz, gur û hwd |
| **pîso** | 1. şewat 2. bêhna şewatê3. ariya pîneyê şewitî; bîso *“agir pê keve, bêhna pîso jê nayê” |
| **pîst [I]** | pêsîr, berstûk |
| **-pîst jê daweşandin** | 1. pêsîr jê daweşandin 2. xwe jê parastin |
| **pîst [II]** | çerm, eyar |
| **pîşat** | berwext |
| **-bi pîşatî** | bi pêşdemî |
| **pîşe** | 1. meslek 2. huner, sinaet |
| **pîşesaz** | 1. sinaetkar 2. meslekdar |
| **pîşesazî** | sinaetkarî |
| **pîşo** | 1. hevirheste 2. barût*“agir û pîşo li cem hev nabin” |
| **pît [I]** | tîp, herf |
| **pît [II]** | çîk |
| **pît [III]** | jîr û serbixwe |

| | |
|---|---|
| **pît [IV]** | zibilî û çilmisî |
| **pît [V]** | adan, bereket |
| **pît [VI]** | pihêt |
| **pît [V]** | di benderan de singê ku werisê keştiyê pê ve girêdidin |
| **pîtol** | fîlozof |
| **pîtros** | lîstika çavgirtonekê |
| **pîv** | 1. qiyas 2. kêş 3. radeya kêşa tiştekî |
| **pîvan [I]** | 1. terazî 2. kêş3. rayîş |
| **pîvan/dipîve /bipîve [II]** | 1. ji aliyên giranî, dirêjahî hwd ve qeys û miqdara tiştekî hildan 2. ceribandin*“aqil bi diravî nayê pîvan” |
| **-pîvan û ro kirin** | dan ber hev û biryar dan |
| **pîvandin/dipîvîne/bipîvîne** | 1. ji aliyên giranî, dirêjahî hwd ve qeys û miqdara tiştekî dan hildan 2. dan ceribandin |
| **pîvek** | kod |
| **pîvok** | sosin, gangilok |
| **pîvaz** | cureyekî çêreya bêhnkirêt e lê tê xwarin*“merî pîvazê nexwin, bîn ji devê wan nayê” |
| **pîvazok** | 1. pîvaza ter 2. serikê hin gulan |
| **pîzang** | moza guhdirêjan; kermêş pîzpîzik fîq, dûdik |
| **PK** | kurteya /piştî koçê/, piştî hicreta Cn. Pêxember eleyhiselamî |
| **pok** | pidû, pirî |
| **pol [I]** | 1. di dibistanan de her saleke perwerdehiyê; sinif 2. di dibistanan de her jûreke kuş tê de perwerdehiyê dibînin; fêrgeh |
| **pol [II]** | bizot |
| **pol [III]** | dendikên mêweyan |
| **pol [IV]** | pola |
| **pola** | hesinê avdayî yê pir xurt |
| **Polan** | Birca Satilê *“Polan hişk û sar, kadîn tar û mar” |
| **polandin/dipolîne/bipolîne** | tesnîf kirin, bi keys kirin |
| **polayî** | tiştê ji polayê *“ji nanê gênim re, zikê polayî divê” |

| | |
|---|---|
| **polik** | 1. bişkojk 2. diravê zîvîn û zêrîn 3. cureyekî sewzeyan e û pijandî tê xwarin |
| **polke** | cureyekî sewziyan e û libên wan bi qasî nokan e |
| **ponijîn/diponije/biponije** | 1. kûr û têr ramîn; fikirîn 2. bêdeng man*“her kes, ji bo karê xwe diponije” |
| **por** | pirça bi sêrî ve hêşîn dibe, gijik *“destê bi don pêşiyê di porê xwe bide” |
| **-por li ber tavê spî kirin** | temenekî dirêj di nezaniyê de bihurandin |
| **porçe** | 1. porê çêkirî; zirpor2. alaveke ku bi sêrî ve porikekî sext heye û pê diran tên paqijkirin3. hemû alavên maliştinê yên ku ji destikekî û serikekî biporik pêk tên |
| **porik** | 1. porê ziravik û kurt 2. qumaşê ku bi rûyê wî ve rîşiyine hûrik hene 3. rîşî |
| **porşikên** | nexweşiya pordaweşînê |
| **porg** | kîsik |
| **porişk** | 1. kesê ku rişk ketine serê wî 2. keç |
| **porpare** | bi qasî mûyekî zirav |
| **porteqal** | cureyekî mêweyan e |
| **porxan** | kincên ji postên giranbiha |
| **posat** | amûrên pêwist |
| **posîde** | kesê bêgêwil |
| **posîde bûn** | bêgêwil bûn |
| **posîde kirin** | bêgêwil kirin |
| **post** | 1. çêrm 2. çermê gurandî*“dostê min, dijminê postê min” |
| **-ji post kirin** | gurandin |
| **postal** | sapokên çermîn |
| **poste** | ferman an jî nameya ku li ser çêrman hatiye nivîsandin |
| **posteger** | kesê ku fermanên dûgelê û nameyên hemwelatiyan digihînin cihên têkildar; pîlik |
| **postexane** | saziya ku ferman û nameyan digihîne cihên têkildar |
| **-post kirin** | gurandin |
| **-post tijî pere kirin** | ji qîmetê zêdetir lê dirav mezaxtin |
| **postnişîn** | şêxê terîqetê, serekê sofiyan |
| **poş** | lêxistina bi qiloçan; tel |

| | |
|---|---|
| **poşe** | 1. (simbêl) palik, stûr2. jina şerkar |
| **poşî** | şaşika mêranî; egal |
| **poşîn/dipoşe /bipoşe** | 1. pûşî giredan 2. xêlî kirin |
| **poşman** | 1. berxweketî 2. vegeriyayî 3. towbekar*“aşvan, tu car nabe poşman” |
| **poşman bûn** | 1. li ber xwe ketin 2. vegerîn 3. towbe kirin |
| **poşmanî** | 1. berxweketin2. vegerîn 3. towbekarî*“dara poşmaniyê, ber nagire” |
| **pot [I]** | kinceke stûr a zivistanî ye û bi ser de tê lixwekirin |
| **pot [II]** | pût |
| **potik** | qerpal *"sal bi serma ye, potik bav û bira ye" |
| **potîn** | sola çêrmîn a ku nalçeya wê darîn e |
| **poto** | bejnbihust, xirdik |
| **poxîn** | cureyekî helewa ku ji ardî tê çêkirin |
| **poz** | 1. bêfil, kepû 2. nikil, nik |
| **-pozê xwe daliqandin** | mirûzê xwe tirş kirin, xwe pirçî kirin |
| **pozbilind** | 1. qure 2. kaw |
| **pozberî** | 1. reqabet 2. hilkeftin û dakeftin 3. keft û left |
| **pozheçî** | bêfildirêj, bêfilxortim |
| **pozmik** | devgema ku davêjin devê golik, berx û karan da ku nemêjin |
| **pozxane** | girtîgeh |
| **Pş** | kurteya /piştî zayînê/; piştî mîlada Cn. Îsa eleyhiselamî |
| **pun/pung** | koxikê mirîşk, qaz û hwd |
| **puwaz** | bûjena ku pê cerxa dirên tijî dikin |
| **puxte** | 1. esl û unsurê esasî2. gewher 3. naverok |
| **pûç** | 1. xerab 2. netêw 3. genî û afnikî |
| **-pûçên hev dan** | der pêşkarî hev bûn û bîsên hev eşkere kirin |
| **pûç bûn** | 1. xera bûn 2. betal bûn 3. genijîn |
| **pûç kirin** | 1. xera kirin 2. netêw hesibandin, betal kirin 3. genijandin |
| **-pûç derxistin** | 1. berevajî kirin 2. nerastiya tiştekî nîşan dan; derewandin |
| **pûg** | 1. berfa nû 2. firtoneka berfê |

| | |
|---|---|
| **pûjan** | pûng |
| **pûl** | pîl |
| **pûnik** | êwirgeha sewalên bibask ên malê yên mînanî dîk, mirîşk û werdekan |
| **pûng** | cureyekî çêreya ku tê xwarin *“mar ji pûngê aciz bû, pûng jî çû û ber devê qula mêr hêşîn bû” |
| **pûngal** | 1. pûnik 2. hêlîn*“hêka genî, di pûngalê de dimîne” |
| **pûr kirin** | qalik spî kirin, qeşartin |
| **pûrt** | 1. pirç 2. pirça çivîkan |
| **pûrtik** | 1. pirça firindeyan2. gulikên daran |
| **pûş** | 1. qurcûm 2. qirş û qesel 3. giyayê bêkêr |
| **-pûş kutan** | keda yekî bi ro de çûn |
| **-pûş şîşî qûnê kirin** | bi zorê karek bi teral an jî newêrekekî dan kirin |
| **pûşil** | edeb, terbiye, heya |
| **pûşî [I]** | 1. şara seriyan 2. kefiya stûyî |
| **pûşî [II]** | pêşî, spêle |
| **Pûşper** | meha şeşan a zayînî, Hezîran |
| **pût** | tiştê ku ji bilî Xwedê jê re tê perestin |
| **pûte** | baldarî |
| **-pûte pê dan** | 1. giringî pê dan, bal dan 2. lê miqate bûn |
| **pûtparêz** | kesê ku ji pûtan re perestişê dike |

# Q

| | |
|---|---|
| **q/Q** | tîpa bîstemîn a alfabebeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê ezmandevî û qirikîye, awayê belavbûna wê girtî û hişk e |
| **qabiliyet** | 1. hêza pêkanînê2. huner û pîşe |
| **qabqab** | şimikên ku binê wan darînî ye |
| **qabûr** | parçeyên şikestî ên tas û qasikan |
| **qaçanî** | tasika ji porselenê |
| **qaçil [I]** | qaşil, qalik |
| **qaçil [II]** | biþku |
| **qaçil kirin** | 1. spî kirin 2. dapîtin *"li pişt baranê qaçil dike" |
| **qaçî kirin** | (jin) por kurtisandin |
| **qad** | 1. meydan 2. war, dews 3. delîve |
| **qadî** | dozger *"dinya qadî ye, her kes ji xwe razî ye" |
| **qadûk** | beroşa biçûk; qasik |
| **qaf** | 1. tiştê req û vala 2. |
| | tasa seriyî |
| **qaf bûn** | parçe bûn |
| **qafik** | 1. kaxetîta ku pê serê banan tê avakirin 2. guldanka dûvedirêjkî ya ji kaxetîtê |
| **qafilqeda** | qezaya nedîtî û nebînayî |
| **qaf kirin** | parçe kirin |
| **qafok** | gildîna ku lêkend bi xwe re tîne |
| **qafqafî** | parçeparçeyî |
| **qafqafî bûn** | parçeparçeyî bûn |
| **qafqafî kirin** | parçeparçeyî kirin |
| **qafqiloz** | derdanên ji xweliyê; kaxetît |
| **qaj** | 1. cureyekî daran e 2. qaş |
| **-fisteqa qajê** | berên dara qajê |
| **qajeqaj** | qîjeqîj |
| **qajên** | qîjên, qîjînî |
| **qajik** | benîştê ku ji dara bênîşt tê bidestxistin |

| | |
|---|---|
| **qal [I]** | behs |
| **-qala yekî kirin** | behsa yekî kirin |
| **qal [I]** | tişt req, pehn û tenik |
| **qalbox** | dermanê ku birînên ajalan didin da ku kurmî nebin |
| **qalebal** | axaftina beletewş |
| **qalib** | amûra ku tiştan tê de ro dikin; bilûl |
| **qalik** | 1. qaşil 2. amana valakirî3. qaşilê fîşenga teqandî*“bila zikê mirovî têr be, bila bi qalikê dêr be” |
| **qalind** | stûr *“qalind hetanî zirav dibe, zirav diqete” |
| **qalind bûn** | stûr bûn |
| **qalind kirin** | stûr kirin |
| **qal kirin [I]** | 1. behs kirin2. qise kirin *“aşiq birçî dibin, qala nanê dawetan dikin” |
| **qal kirin [II]** | (zîv ji madenên din) dawerivandin |
| **qalo** | kevirê tehtevêlkî yê ku nan li ser tê pijandin; qafika nanpehtinê |
| **qalonçe** | bihukeke ku zirarê dide gênim |
| **qam** | bejn *“qam qama kermêşê, deng dengê gamêşê” |
| **qamçûr** | kamçûr |
| **qame** | 1. cureyekî xenceran e 2. sator an jî kêrikeke ku bi serê tivingan ve dikin û di þerên ku du eniyên dijmin dikevin nav hev de tê bikaranîn |
| **qamik** | 1. movik 2. tiliya beranekê |
| **qamir** | 1. giyayê qert 2. qamîş |
| **qamir bûn** | (giya) qert bûn |
| **qamîş/qamûş** | leven |
| **qamk** | tiliya mezin |
| **qamkinik** | 1. bejnkinik 2. xirdik |
| **qang** | paqijkirina bi hilm û gilmê |
| **qang kirin** | bi hilm û gilmê paqij kirin |
| **qanik [I]** | kefkanî |
| **qanik [II]** | cureyekî çêreyê ye û jê benîşt tê bidestxistin |
| **qanî** | razî |
| **qanî bûn** | razî bûn |

| | |
|---|---|
| **qanî kirin** | razî kirin |
| **qantir** | sewala ku ji têkiliya di navbera hesp û keran de çêdibe; hêstir*“qantir nazê, xwê şîn nabe” |
| **qanûn** | zagon |
| **qanûnî** | zagonî |
| **qap** | 1. gotina ji qewarê xwe mezintir 2. axaftina gir û qelew |
| **-qap berdan** | ji xwe mezin axaftin |
| **qapût** | kinceke stûr a zivistanî ye; sako, qemsele |
| **qaq [I]** | vizvizîk |
| **-qaqa ser cemedê** | aqilsivik, selemtî |
| **qaq [II]** | 1. hêk 2. (di zimanê zarokan de) tiştê şikestokî |
| **-qaqa reş** | hêka reş a ku nîşaneya karesata herî mezin e |
| **-li qaqa reş asê kirin** | tûşî felakete pir mezin anîn*“li ser me bû roja reş, em asê kirin qaqa reş” |
| **qaq [III]** | qeşa |
| **-qaq girtin** | qeşa girtin |
| **qaqê** | 1. hêk 2. (di zimanê zarokan de) tiştê şikestokî*“biçûkayî dibêje hêk, mezin dibe û dibêje: ‘qaqê’ ” |
| **qaqil** | cureyekî çêreyê ye |
| **qaqlîbaz** | cureyekî çivîkên zeryayî e |
| **qaqreş** | kundirê qemer |
| **qarandin/diqarîne/biqarîne** | 1. qîjandin 2. zêrandin |
| **qarç [I]** | cureyekî daran e |
| **qarç [II]** | hestiyê qorikê |
| **qarçik** | hêt *“berû da bizinê, dest avête qarçike” |
| **qarçikî** | kesê ku hestiyê qorika wî şileke bûye; xawûşe |
| **qareqar** | qajeqaj |
| **qareqar kirin** | qajeqaj kirin |
| **qarên** | qîjên |
| **qarik** | kesê bêçare |

| | |
|---|---|
| **qarix** | di nav bîstanekî de kerdiyên sewzeyan |
| **qarîn/diqare /biqare** | 1. qîjîn, qîrîn 2. bang kirin*"mirîşk biqare, hêkê dike" |
| **qarînî** | qarên |
| **qarot** | bistikê giyayî |
| **qartik** | bizmarê darînî |
| **qarûþe** | siqayîla çilpiyan |
| **qas** | 1. miqdar 2. heyam |
| **-vê qasê** | vê gavê |
| **qasid** | peyamber, berdevk |
| **-qasidê qolfelekê** | melkemot, ruhstîn |
| **qasik** | 1. feraqên ku tê de xwarin tê pijandin 2. derdan *"qasikan malêse, bi alastinê zik têr nabe" |
| **qaş** | kevirên giranbiha yên ku di gustîl, gerdenî û tiştên din de tên çikandin |
| **-qaşa çavî** | şûna ku çav tê de ye |
| **qaşil** | 1. qalik 2. hûrik û mûrikên bermayî *"kara necaran, qaşilên daran" |
| **qaşo** | xwedîgiravî |
| **qat** | 1. tetqal 2. her parçeyekê du tiştên ku li ser hev in; taq, ta |
| **qat bûn** | 1. duta bûn 2. tewîn |
| **qat kirin** | 1. duta kirin 2. tewandin 3. keys kirin |
| **qatqatî** | 1. her parçeyekê pir tiştên ku li ser hev in; taqtaqî, tatayî 2. keyskirî |
| **qatqatî kirin** | ber bi jor li ser hev keys kirin |
| **qawêr** | gergere |
| **qawit** | cirî, erzaq |
| **qawûş** | 1. kember, qûş 2. bûjenên ku ji zaxkirina niftê çêdibin |
| **qax** | mêweyên hişk-kirî yên ku dendikên wan jê hatine avêtin |
| **qax kirin** | (mêweyên ku dendikên wan hatine avêtin) ber tavê hişk kirin |
| **qayde** | rêbaz |
| **qayil** | razî |
| **qayil bûn** | razî bûn |
| **qayîm** | muhkem û şidiyayî |

| | |
|---|---|
| **qayîm bûn** | şidîn û xurt bûn |
| **qayîm kirin** | şidandin û xurt kirin |
| **qaz** | cureyekî sewalên bibask a malê ye *“qaz bi qazan re, baz bi bazan re û mirîşka kor bi dîkê kulek re” |
| **qazim** | bendê ji hiriya hêştiran |
| **qazî** | hakimê dadwer*“heke qazî nebe, kumê xwe ji xwe re bike qazî” |
| **qe/qet** | 1. tu/çu, hîç 2. ma, ma qey *“qe berkêş, bi mêvanan geş?” |
| **-qe na** | qet nebe, hîç nebe |
| **-qet nebe** | hîç nebe |
| **qeb** | binavêlîstin, zorankirin |
| **qebale** | kirîn û firotina bi giştî |
| **qebalek** | dolaba ku di qefa dîwêr de tê çêkirin |
| **qebare** | qeware |
| **qebeqeb** | dengê domdar ê xwendina kewan |
| **qebeqeb kirin** | (kew) bi awayekî domdar xwendin |
| **qebrax** | 1. deyûs 2. jinfiroş |
| **qebraxî** | 1. deyûsî 2. jinfiroşî |
| **qebûl bûn** | 1. pejirîn 2. peyitîn 3. çespîn |
| **qebûl kirin** | 1. pejirandin2. peyitandin 3. çespandin |
| **qebz** | rewşa bêtenduristiyê ya ku doran gemara hundirî navêjin derve |
| **qebz bûn** | gemar di doranan de hişk bûn û derneketin derve |
| **qed** | bejn |
| **qeda** | bela, felaket, karesat |
| **qedandin/di qedîne/biqe dîne** | kuta kirin |
| **qedeh** | 1. piyan 2. îskan*“qedeheke jehrê vexwe, lê qurteke qehrê vemexwe” |
| **qedemgeh** | destşok, daşir |
| **qedexe** | 1. fermana nekirinê2. heram |
| **qedexe kirin** | 1. fermana nekirinê dan 2. herimandin3. heram hesibandin |
| **qedîm** | tiştên berê û kevn |

| | |
|---|---|
| **qedîn/diqed e/biqede** | **1.** xelas bûn, kuta bûn, red bûn **2.** biriyan |
| **qedr** | **1.** giramî, rêzdarî **2.** nirx, biha *“**qedr**ê mêvanan, qedrê Xwedê” |
| **qed û qamet** | bejn û bal |
| **qef** | **1.** cihê vala yê wekî sîwanekî di ber kevir û newalan de **2.** cihê talde û qûze **3.** hawirdor, çember |
| **qefaltin/diqe fêle/biqefêle** | **1.** girtin **2.** bi dest xistin **3.** zirze kirin |
| **qefare** | kilîleke mezin a darînî ye |
| **qefare kirin** | bi qefareyê kilîl kirin |
| **qefçil** | kirêt |
| **qefes** | **1.** sersîng **2.** paçika dorgirtî û tenik a ku tiştê li hundir ji derve ve tê dîtin |
| **qefilandin/di qefilîne/biqe filîne** | li ber sermayê qerisandin |
| **qefilîn/diqefi le/biqefile** | ji ber sermayê qerisîn |
| **qefle** | **1.** ref **2.** kerî |
| **Qefş** | **1.** baqek giya **2.** por |
| **qehirandin/d iqehirîne/biq ehirîne** | **1.** rik anîn,hêrs anîn **2.** behicandin **3.** ji kerban teqandin |
| **qehirîn/diqe hire/biqehire** | **1.** rik hatin, hers hatin **2.** behicîn **3.** ji kerban teqîn |
| **qehitîn/diqe hite/biqehite** | xela û tunetî lê peyde bûn |
| **qehr** | **1.** zulm û pêkutî **2.**xem û keser ***“**mirov ji ber **qehr**an, xwe davê behran**”**<br>**-ji qehran tetirxanî bûn** ji kerban mirin |
| **qehreman** | mêrxas, egîd |
| **qehremanî** | mêrxasî, egîdî |
| **qehwe** | rehekeke ku dendikên wê tên hêran, di avê de tê kelandin û ev av digel şêkir di pinganan de tê vexwarin |
| **qehweyî** | di rengê qehweyê de; qemerê tarî |
| **qel** | elok |
| **qela** | cureyekî maden ê ku wekî hêsin tê bikaranîn |

| | |
|---|---|
| **qela kirin** | alav an jî aman bi qelayê rûpûşkirin |
| **qelafet** | temtêla lixwekirina yekî; ser û sîçê |
| **qelandin/diqelîne/biqelîne** | **1.** qijirandin **2.** Ji nav birin **3.** qetliyam kirin ***"**an em bixemilînin,an **biqelînin"**<br>**-binçirk qelandin** bi reh û rîçalan ve hilqetandin û şewitandin |
| **qelareş** | **k** cureyekî reşêlekan e |
| **qelaştin/diqelêşe/biqelêşe** | **1.** dirandin **2.** qul kirin |
| **qelax** | **1.** qûçê kermeyên jenandî **2.** sarcîn |
| **qelb [I]** | dil |
| **qelb [II]** | qulebî, teqlîd, sexte ***"**gayê **qelb**, bare giran hilnade**"** |
| **qelem** | amûra nivîsandinê; pênûs |
| **qelembir/qelemtiraş** | amûra tûjkirina serê pênûsên darînî |
| **qelemdank** | aman an jî tûrikê ku pênûsan dikinê; pênûsdank |
| **qelemon** | dîkê elokan |
| **qelemzirêç** | cureyekî pênûsên darînî ye û bûjena zirîçdar a di nava wê de dinivîse |
| **qelend** | şert û heqên jinê ên ku ji bo zewacê dide pêşiya kesê xwestî ***"**keça mîran, bi **qelend**ê gavanan nayê**"** |
| **qelend birîn** | şert û heqên jina ku hatiye xwestin diyar kirin |
| **qelender** | jîr û jêhatî |
| **qelenderî** | jîrtî û jêhatîtî |
| **qeleş** | minexet û xayîn |
| **qeleşî** | minexetî û xayîntî |
| **qelew** | **1.** stûr **2.** kok |
| **qelew bûn** | **1.** stûr bûn **2.** kok bûn ***"**beq çiqas kok dibe, qûn ewqas lê **qelew dibe"** |
| **qelew kirin** | **1.** stûr kirin **2.** kok kirin |
| **qelibîn/dielibe/biqelibe** | **1.** dan ber xwe û çûn **2.** noqî tev bûn **3.** wergerîn<br>**-tê qelibîn 1.** lê asê bûn **2.** noqî tev bûn |
| **qeliqandin/diqeliqîne/biqeliqîne** | **1.** Gêjomêjo kirin **2.** nav tê dan **3.** tehrîk kirin |
| **qeliqîn/diqelique/biqelique** | **1.** şaşopaşo bûn **2.** niçîn |

| | |
|---|---|
| **qelişandin/diqelişîne/biqelişîne** | **1.** derizandin **2.** dirandin **3.** Kirin çend biran |
| **qelişîn/diqelişe/biqelişe** | **1.** derizîn **2.** dirîn **3.** bûn çend biran |
| **qelizandin/diqelizîne/biqelizîne** | xwe vedizîn, fizirîn |
| **qelizîn/diqelize/biqelize** | **1.** Lê telandin, pêdizkî bi rê ve çûn **2.** li benda firsendekê man |
| **qelî** | gotê qelandî ***"**ji serê qijikan, **qelî** çênabe**"** |
| **qelîn/diqele/biqele** | **1.** bi tîna germê req bûn **2.** li ser agirî pijîn **3.** ji ber bêaviyê çilmisîn **4.** Ji navê çûn, binevat bûn |
| **qelîsêl** | goştê di sêlê de qelandî; sêleqelî |
| **qelîştek** | **1.** derz **2.** cerx **3.** qul |
| **qelqeloşk** | nanê ku li ser sêlê qelyaye û dema xwarinê kirekir jê tê |
| **qels** | **1.** zeîf **2.** lawaz **3.** jor **4.** hejar **5.** yax |
| **qelsemêr** | **1.** mêrê ku tenê bi navê xwe mêr e **2.** nemerdê ku di lisfê mêrxasan de xuya dike **3.** şindokê mêran ***"**bila mêr bi destê mêran bêne kuştin, ne bi destê **qelsemêr**an**"** |
| **qelsî** | zeîftî, lawazî, jarîtî |
| **qelş** | **1.** derz **2.** cerx **3.** qul |
| **qelûn** | darcixare |
| **qemalax** | di rojên berfî de nêçîra kewan a bê çek |
| **qemandin/diqemîne/biqemîne** | qemirandin |
| **qematik** | pêçeka zarokê |
| **qemb** | cewiyên zeliqî |
| **qemç** | boçik, dûv, dêl |
| **qemçik** | cureyekî baskê ku ji çerm û têla zirav dihûnin da ku pê ajalan bibezînin; şelaq |
| **qemer** | rengê qehweyî yê girtî |
| **qemerdîn** | pestîlê arûngan |

| | |
|---|---|
| **qemirandin/diqemirîne/biqemirîne** | **1.** (bi tîna germê) reng lê tarî kirin **2.** kizirandin |
| **qemirîn/diqemire/biqemire** | **1.** (bi tîna germê) reng lê tarî bûn **2.** kizirîn |
| **qemsî** | paşbêj |
| **qemtik** | destmala hevrêşîmî ya biçûk |
| **qemûşk** | qalikên birînê |
| **qenc** | **1.** baş **2.** rind **3.** delal |
| **qencî** | **1.** başî **2.** rindahî **3.** delalî *“**qencî**, qenciyê nas dike” |
| **qend** | şekir |
| **qendav** | ava kelandî û xalî ya ku şekir berdane tev |
| **qendîl** | çira |
| **qenter** | amûra ku barên giran dikêşe |
| **qentere** | stûna wekî lûleyeke dirêj |
| **qepûşk** | şeytanok |
| **qer** | rengê reş ê birqonek |
| **qeram [I]** | taqet, mecal<br>**-ji qeramê ketin** ji qudûm ketin |
| **qeram [II]** | dervank |
| **qeramûşk** | quncirok |
| **qerandin/diqerîne/biqerîne** | **1.** veterisandin **2.** vepesirandin **3.** jan jê birandin |
| **qerar** | biryar *“dinya soz û **qerar** e, ne behs û bazar e” |
| **qerar dan** | biryar dan |
| **qerase** | **1.** telhîn û dirêj, tot û dirêj **2.** malêle |
| **qeraş** | aşvan *“derdê qerê, av her ser êş” |
| **qerax** | **1.** kêlek **2.** kêleka çem û zeryayê |
| **qerd** | qerz |
| **qereçî** | **1.** cingene **2.** qelaçêker *“keçika **qereçî** nabe xatûn” |
| **qeresî** | gêlas |

| | |
|---|---|
| **qerem** | leven, qamîş |
| **qerf** | **1.** henek **2.** tinaze, tirane |
| **qerfî** | mizahî |
| **qerfok** | henekbaz |
| **qerimandin/diqerimîne/biqerimîne** | **1.** westandin û ji qudûm xistin **2.** tevizandin |
| **qerimîn/diqerime/biqerime** | **1**. westîn û ji qudûm ketin **2.** tevizîn |
| **qerisandin/diqerisîne/biqerisîne** | **1.** tepisandin **2.** cemidandin |
| **qerisîn/diqerise/biqerise** | **1.** tepisîn **2.** cemidîn |
| **qerîn/diqere/biqere** | dev jê berdan |
| **qerîngan** | korîgan |
| **qermiçandin/diqermiçîne/biqermiçîne** | bi ser hev de quvaştin |
| **qermiçîn/diqermiçe/biqermiçe** | **1.** xaromaro bûn **2.** xiltomilto bûn |
| **qermîçok** | **1.** xilimxaro **2.** xiltomilto |
| **qernebît** | kelem |
| **qero** | evîna hunerê |
| **qerome** | darekî devçeqel î ku bi kêrî çemandina destikê gopalan tê |
| **qerpal** | **1.** pîne û potik **2.** zîvalzîvalî **3.** bi ser hev de rizîn |
| **qerqaş** | çîlspî |
| **qerqef** | avdank, badîn |
| **qerqeşûn** | **1.** pola **2.** tiştê pir hişk |
| **qerqîlk** | qaxê xerûzeyan |
| **qerqûde** | **1.** skêlet **2.** kelax |
| **qerqere** | qerqûde |

| | |
|---|---|
| **qersîl** | cehê ter |
| **qersûn** | dîzika devfireh |
| **qert** | **1.** giyayê qamir **2.** mirov û sewalê pîr |
| **qert bûn** | **1**. (giya) qamir bûn **2.** (mirov û sewal) pîr bûn |
| **qertaf [I]** | (r) îlaweyên ku wateyeke nû didin peyvan |
| **qertaf [II]** | hingivê herî nû yê mêşa hingivî |
| **qerwaş** | berdestiya jin; cêrî |
| **qerz** | tiştên ku heta maweyeke diyarkirî hatiye hildan; deyn |
| **qerzdar** | deyndar |
| **qesab** | **1.** goştfiroş **2.** kesê ku serê sewalên ku goştê wan tê xwarin jê dike, digure û kelepîçe dike **3.** kujerê bêrehm |
| **qesd** | **1.** arman **2.** niyêt |
| **qesel** | bistê giyayê çinandî yê ku li erdê maye; qirşik |
| **qesem** | sond |
| **qesik** | bûjeneke ku dişibihe tevna tevnepîrkê û hin kurmikên bihukan asteke jiyanê di nav de dimînin |
| **qesîl** | şanişîna li pêşiya malê |
| **qesîs** | **1.** xesîs 2. çiriz 3. bexîl |
| **qesp [I]** | xurme ***“**diyarî **qesp** in, şûndiyarî hesp in**”** |
| **qesp [II]** | biçêxeke ji zêrî |
| **qespik** | firindeyek e |
| **qesr** | koçk û sera |
| **qesrawî** | wekî koçk û serayan |
| **qest [I]** | meqsed, mebest<br>**-bi qesta yekî/titekî** bi mebesta yekî/tiştekî |
| **qest [II]** | derew<br>**-ji qestan** qestîka |
| **qestbane** | qestîka |
| **qestîka** | bi derewînî |
| **qeşa** | cemed<br>**-qeşa girtin** cemidîn |
| **qeşadank** | amana ku cemedê dikinê |

| | |
|---|---|
| **qeşartin/diqeşêre/biqeşêre** | qaşil spî kirin, qalik jê xistin |
| **qeşeng** | **1.** bedew **2.** rind |
| **qeşmer** | **1.** olintî, selemtî **2.** bêkesayet ***"**gur pîr dibe, dibe **qeşmer**ê roviyî**"** |
| **qet [I]** | qe |
| **qet [II]** | werisê kinik; qetik<br>**-qet û bend** şirît û kindir |
| **qetab** | pêvek |
| **qetandin/diqetîne/biqetîne** | **1.** qut kirin **2.** qurçimandin **3.** quraftin **4.** dirandin |
| **qetik** | werisê kinik ê ku pê bar û piştî tên girêdan |
| **qetîn/diqete/biqete** | **1.** qut bûn **2.** peritîn **3.** qurçimîn **4.** qurifîn **5.** dirîn ***"**av di cihê gelş de **diqete"** |
| **qetl** | kuştina bi neheqî ***"qetl**a mêran, li erdê namîne**"** |
| **qetl kirin** | bi neheqî kuştin |
| **qetmer** | tetqal |
| **qetran** | **1.** qîr **2.** rengê reş |
| **qetran kirin** | qîr kirin |
| **qetûf** | selika tiriyan |
| **qevd [I]** | baq, destî |
| **qevd [II]** | destika kêr, şûr û hwd |
| **qevdik** | dûvçik |
| **qewad** | qebrax, deyûs |
| **qewal** | serokê êzdiyan |
| **qewan** | alava ku newayan tomar dike |
| **qeware** | **1.** qalib **2.** teşe, dirûv **3.** qeys **4.** birîna kûr |
| **qewarok** | erdê kifşkirî |
| **qewartin/diqewêre/biqewaztin** | **qewêre** qewirandin |

| | |
|---|---|
| **qewaztin/diqewêze/biqewêze** | **1.** bi ser re gav kirin **2.** bi ser re bazdan |
| **qewimîn/diqewime/biqewime** | **1.** bûn **2.** pêk hatin **3.** rûdan |
| **qewirandin/diqewirîne/biqewirîne** | **1.** cehimandin, deherandin **2.** dehfandin, veder kirin |
| **qewitî** | **1.** tembîh **2.** şîret **3.** hêvotin |
| **qewitî lê kirin** | **1.** tembîh kirin **2.** şîret kirin **3.** hêvotin |
| **qewîn** | **1.** qayîm **2.** şidiyayî **3.** muhkem |
| **qewl** | **1.** gotin **2.** peyv **3.** salix ***"qewl**ê Nebî, sê caran e**"** <br> **-bi qewlê mezinan** bi gotina pêşiyan |
| **qewm** | milet, gel ***"qewm**a kewê, kurmê hev e**"** |
| **qewnik** | kundirê avê |
| **qey** | **1.** tu dibejî hema wisa ye **2.** dibe ku wisa be jî |
| **qeyar** | bûjena zeliqandina amanên ji kaxetîtê |
| **qeyd** | amûra girêdana piyên hêsîr û girtiyan |
| **qeydik [I]** | bazinê ku davêjin stû an jî piyan û pê girêdidin |
| **qeydik [II]** | **1.** movika ku destan bi milan ve girêdide **2.** movika ku piyan bi lingan ve girêdide |
| **qeyd kirin** | **1.** zincîr kirin **2.** tomar kirin **3.** nivîsîn |
| **qeyran** | **1.** buhran **2.** alozî <br> **-qeyrana aborî 1.** lawaziya îqtisadî 2. kêmdebarî |
| **qeyre** | **1.** kesê navsere **2.** maldemayî; nezewicî <br> **-qeyre bûn** di mal de man û şû nekirin |
| **qeyrejin/qeyremêr** | jin û mêrên ku heta temenê navsaletiyê şû nekirine |
| **qeys** | pîvan |
| **qeysik** | darikên ku kêmlebat didin bin milên xwe da ku pê bimeşin |
| **qeysî** | arûng |
| **qeytan** | cureyekî qumaşê birqonek î kêmber e û pê dora pirtiyan tê neqişandin |

| | |
|---|---|
| **qez** | hevrîşim |
| **qeza** | **1.** biryara Xwedê ya di heqê yekî de **2.** Bobelat **3.** xeletiyeke ji ber xemsariyê ***“**roj diçe, **qeza** naçe**”** |
| **qezaz** | **1.** hevrîşimfiroş **2.** kincdirû |
| **qezî kirin** | axaftin |
| **qêxane** | hêkerûn |
| **qêrqaş** | bi berahî |
| **qible** | li her dera cîhanê îstiqameta Kebeyê<br>**-qibleya xwe şaş kirin** xurifîn û ji rastiyê averê bûn |
| **qiblename** | rûgehnas |
| **qiç/qiçik [I]** | **1.** hindik **2.** biçûk |
| **qiç [II]** | ling |
| **qiçî** | cureyekî çereya ku nepijî tê xwarin |
| **qiçrût** | lingtazî |
| **qidîk/qidqidîk** | rewşa ku ji ber temasa destekî biyanî li hin cihên hesas dikeve û kenê mirovî tê |
| **qidûm [I]** | awa, tehr, celeb |
| **qidûm [II]** | taqet, hêz<br>**-qidûm şikestin 1.** bêhêz man **2.** ser û sîçe xera bûn |
| **qijik** | **1.** cureyekî firindeyan e **2.** reben ***“**ji sere **qijik**ê, qelî çê nabe**”** |
| **qijilandin/diqijilîne/biqijilîne** | qijirandin |
| **qijilîn/diqijile/biqijile** | qijirîn |
| **qijirandin/diqijirîne/biqijirîne** | **1.** di rûn de sor kirin **2.** tîna germê zêde kirin **3.** pir derew kirin |
| **qijirîn/diqirile/biqirile** | **1.** di rûn de sor pijîn **2.** tîna germê zêde bûn **3.** şer giran bûn |
| **qijnik** | qirnî |
| **qilalî** | panêr û notirvan |
| **qilalî kirin** | payîn û notirvanî kirin |
| **qilamcik** | çivîkek e |

| | |
|---|---|
| **qilç** | **1.** di lîstikê de serkeftin **2.** xwar **3.** cihoka avê<br>**-qilç kirin 1.** di lîstikê de jê birin **2.** xwar kirin<br>**-qilç qut kirin** xwar birîn |
| **qilêr** | qirej, nepaqij |
| **qilêwî** | feraq |
| **qilik** | kilîla darînî ya deriyan |
| **qilinc kirin** | (ji ber serma an jî nexweşiyê) xwe guvaştin hev |
| **qilî bûn** | xidikîn |
| **qilîç** | tiliya herî biçûk a dest û piyên mirovan |
| **qiloç** | stroyên heywanan ***“**gayê ku **qiloç**ê xwe li dîwaran bixe, rojekî dê qiloçê wî bişkê**”** |
| **qilozan** | qulopanî |
| **qilpik** | îskînîkirina ji ber têrbûnê |
| **qilqilik** | cureyekî kilîlên darînî ye |
| **qilqilîç** | qilîç |
| **qilûmik** | goc, qop, kop |
| **qimar** | **1.** lîstina ser tiştan **2.** merca bi berdêl |
| **qimarbaz** | kesê ku qimar dilîze ***“**kesî negotiye: ‘ev mala dizan û **qimarbaz**an e**”** |
| **qimil** | cureyekî kêzikan e |
| **qinare** | debaxane, mezbehe |
| **qinc** | bi dirêjahî |
| **qincok** | xêza bi dirêjahî; hêlîlar |
| **Qinik** | cihê ku mirîşk, qaz û werdek lê tên êwirandin, pin/pinik |

| | |
|---|---|
| **Qinût** | çikûs, bexîl |
| **qinyat/qinaet** | 1.bawerî 2.qîmpêanîn *“ji axê pirtir tuneye, mar bi qinaet jê dixwe” |
| **qir** | 1. mirin 2. kuştin |
| **qiraç** | çapa navbera du xêzên ku hev dibirin |
| **qirak** | qijika reş |
| **qirar** | qerar *“hesp bi hefsaran, mêr bi qiraran” serê xwe” |
| **qirask** | 1.ziyandar 2.bela bêpere ya ku bi pêsîra xelqê ve digire 3.letemeya rûyan 4. kesê ku miseletî serê xelqê dibe*“xwedî kir bi destê xwe,kir qiraskê |
| **qir bûn** | 1. mirin û tune bûn 2. binçirk lê qelîn |
| **qirç** | dengê şikestina dar,lek, hestî û tiştên req |
| **qirçandin/diqirçîne/biqirçîne** | dengê qirçîniyêpê xistin |
| **qirçeqirç** | dengê domdarê sotina daran, teqînaguleyan an jî hûrbûn û şkestinê |
| **qirçên** | 1. dengê ku ji ber egera rakêşan an jî vekirina movikên laşî tê 2.dengê şikestinê |
| **qirçînî** | qirçên |
| **qîrçînî pê ketin** | şîrqînî pê ketin û şikestin an jî ji hev derketin |
| **qird** | cureyekî heywanan e û ji bilî peyivîne hemû bizavên mirovan dubare dike |
| **qirdik** | 1. sersar 2.rêşkenî 3.jina ku nave wê bi nebaşiyê derketiye |
| **qireqir** | dengê mirîşka berhêk |
| **qireqir kirin** | (mirîşk) berî hêk-kirinê qîjeqîj kirin |
| **qirêj** | 1.qilêr, nepajij 2.lewitî |
| **qirej bûn** | 1.qilêr bûn 2.lewitîn |
| **qirêj kirin** | 1.qilêr kirin2.lewitandin |
| **qirêjok** | kesê ku ji gemar û gemariyê aciz nabe |
| **qirên** | şer û pevçûn |
| **qirik** | qewrî, stûqulk |
| **qirika dirêjî kêrê kirin** | ji mirinê netirsîn |
| **qirik ziwa bûn** | 1. pir tîbûn 2. gewrî qirqiçîn3.ji tirsan qutifîn |

| | |
|---|---|
| **qirnî** | geneyên hûrik; qijnî |
| **Qirjal** | Bircê Duvpişkî |
| **qir kirin** | 1.kuştin û tune kirin  2.kuta kirin  3.kok lê qelandin |
| **qirneqos** | qirneqot |
| **qirneqot** | texterewan |
| **qirp** | dengê şikestinê; xirt |
| **qirp bûn** | şikestin |
| **qirp kirin** | şikandin |
| **qirp şikestin** | ji nişkê ve xirt şikestin |
| **qirpik** | qilpik |
| **qirpik jê hatin** | ji ber têrbûnê iskînî pê ketin |
| **qirqiçandin /diqirqiçîne/ biqirqiçîne** | 1. dev û ziman lê ziwa kirin 2. tî kirin |
| **qirqiçîn /diqirqiçe/bi qirqiçe** | 1. dev û ziman lê ziwa bûn 2. tî bûn |
| **qirş** | têlên giyayê ziravik |
| **qirş û qal** | gildîn û arekê binê giyayî |
| **qirşik** | qirşên hûrik |
| **qirt** | 1. parçe, piç2. Bertîl 3. hîlebaz |
| **qirt xwarin** | bertîl xwarin |
| **qirtik** | qalikên ku bi ser birînan ve çêdibin |
| **qirtikên porî** | pirtikên ku  ji çermê seran dadiweþe nav porî |
| **qirtik dan** | qalik dan |
| **qirtî** | hîlebazî, qulebazî |
| **qirtî li serê yekî kirin** | qulebazî li serê yekî kirin |
| **qise kirin** | 1.behs kirin 2.qal kirin *“bav ji bajêr tê, law jê re qise dike” |
| **qisim** | 1. beş2. par 3. bir |
| **qisimqere kirin** | 1. parparî kirin2. belawela kirin |
| **qismet** | nesîb *“kes nikare qismetê kesî  bixwe” |

| | |
|---|---|
| **qitî** | ecûr |
| **qiyame** | hevraz |
| **qiyamet** | jîndarbûna piştî mirinê *“ez he me û qiyametim”-roja qiyametê (ji bo hemû mexlûqetan) roja jîndarbûna piştî mirinê |
| **qîç** | [I] çavê korevîçkî |
| **qîç bûn** | çavkortik bûn |
| **qîç kirin** | çavê xwe nêzîkî girtinê kirin |
| **qîç** | [II] 1. bilind 2. Bel 3.derkeftî |
| **qîç bûn** | 1. bilind bûn2. bel bûn 3. diyar bûn |
| **qîç kirin** | xuya kirin |
| **qîçik** | zerê vekirî; rengê kayê |
| **qîçilokî** | 1. zerotankî 2.kesê ku ji ber nexweşiyekê rûyê wî zer bûye |
| **qîjandin/diqîjîne/biqîjîne** | 1. qîrandin, awazeke bilin jê derxistin 2.zêrandin 3.giriyandin |
| **qîjîn /diqîje/biqîje** | 1. Bi awazeke bilind bang dan; qîrîn 2. zûrîn 3.girîn |
| **qîl** | di tûşa dawiya lêvan de du diranên jorîn û duyên jêrîn ên ku tûjtirên diranan e |
| **qîlê xwe di yekî de çikandin** | kesek kirin ber lepê xwe û pê karîn |
| **qîm** | 1.têrî 2.razîtî |
| **qîma xwe pê anîn** | 1. Jê çavtêr bûn 2.jê razî bûn qîmet |
| **qîm kirin** | têrê kirin |
| **qîmet** | 1. qedr2. biha 3. giramî |
| **qîq** | [I] 1. çik 2.ziq 3.şek |
| **qîq rabû şipê** | 1.çik rabû ser piyan 2.rabû şekan 3.li ser piyan ziq bû û sekinî |
| **qîq** | [II] 1.mok û hestî; kelax 2.lawaz 3.kesê bejndirêj |
| **qîq bûn** | bûn mok û hestî;bûn kelax |
| **qîqeqîq** | dengê dîkan |
| **qîr** | [I]bûjeneke ji niftê ya ku dirijînin ser xîçên riyan da ku ji hev belav nebin |
| **qîr û qetran** | reşû tarî |
| **qîr û sîr** | bela û şetele |

| | |
|---|---|
| **qîr kirin** | xîç û xîştorê rê bi qetranê tepisandin hev |
| **qîr** | [II]qîj *“hevalêqîrê,nikilbigû ye” |
| **qîrandin/diqî rîne/biqîrîne** | qîjandin |
| **qîrîn/diqîre/ biqîre** | qîjîn |
| **qît** | 1. çiqil 2. bel û ber çavan; qîç |
| **qîtik** | 1. çiqilk 2. gilê |
| **qîz** | keç *“qîzê bixwaze bi dilê kalan, hespê bikire bi dilê xortan” |
| **qîzap** | keça apî |
| **qîzmet** | keça metê |
| **qîzxal** | keça xalî |
| **qîztî** | 1. keçinî 2.keça birayê bûkê |
| **qoç** | [I] 1.qiloç 2.careke lêxistina ajalên biqiloç; tel |
| **dan ber qoçan** | bi qiloçan dehf dan |
| **qoç** | [II]kemîna ku ji bo nêçîra ajalên kovî tê danîn; dafika dirindeyan |
| **qol** | [I] 1.dûvkinik, boçkinik 2. huçikqol |
| **qol** | [II] 1. car, teql 2.bir |
| **vî qolî** | vê carê |
| **qolinc** | 1.kulang 2.êşa ku dikeve kulangan |
| **qolincê yekî şikandin** | (da ku êşa sermilan bê birîn) kesek di kulangan de guvaştin |
| **qopçe** | cureyekî bişkojkên dubeşî ye û beşa biserî bi beþa biqul ve dizeliqe |
| **qopik** | binikên baçikan |
| **qoqiz** | 1. qirtik 2. girtik |
| **qor** | [I]kalê hophopo/hizhizî; keftor |
| **qor** | [II] 1.şîştir, rêz, dor 2.ref |
| **qorç** | qoç*“qorç,ji beran re ne bar in” |
| **qorede** | heywanê jar; yax |
| **qoreqor** | oreor |
| **qorên** | orên |
| **qorik** | hêt, qarçik |

| | |
|---|---|
| **qorî** | çaydank |
| **qorzî** | gihaneka du xêzên ku rastî hev tên; çivange, qulîzên goşe *“kevrê giran, kevirêqorziyê ye” |
| **qose** | darcixare, qelûn |
| **qoş** | (giyanewer)derxistina tiştê hundir |
| **qoş dan xwe** | 1.(sewala ku dizê) zor dan têjikê da ku derkeve 2.(jina ku diwelide) zor dan zarokê da ku derkeve 3. (gîre) zor dan gemarê da ku derkeve |
| **qot** | [I] 1. hop, balûle2.parî *“gur, bi du qotan namire” |
| **qot** | [II] gupika çiyê; lûtke |
| **qotik** | [I] nexweşiyeke xedar e; xeneqûtik *“qehr û qotika dinyayê naqede” |
| **qotik** | [II] 1.kêrt, gir 2.serî |
| **qotik** | [III]binika baçikê |
| **qotik** | [IV] 1.derd, kul 2. gotina tûj *“xerab ji kul û qotikan, baş jî ji dost û yaran xalî nabin” |
| **qotik** | [V] 1.şeşar 2.kevnegêzî |
| **qotik** | [VI]kurmekî doranan e |
| **qotik** | [VII]goc |
| **qube** | avahiyê ku li ser banê mizgeftan di şêweyê nîvê hêkekî de tê çêkirin |
| **Quds** | bajarê pêxemberan ê li Filistînê *“mirov bi pirsê, diçe Qudsê” |
| **qul** | 1.kun 2.derz 3.qelþ 4. cerx 5.tîş *“qul fireh bibe, pîne nagire” |
| **qulac** | maweya ji sermilekî hetanî sertiliyên mile din |
| **qulbik** | lenger, xepar |
| **qul bûn** | 1.kun tê de çêbûn 2.derizîn 3.qelişîn 4. cerx pê ketin 5.tîştîşî bûn |
| **qule** | ker û hespê ku rengê wan belekiyeke ji reş û zer pêk tê |
| **qulebaz** | kesê ku karên têvel dike û hîleyan tine serê xelqê |
| **qulebazî** | fêlbazî, sextekarî |
| **qulefîskî rûniştin** | li ser simûçkan rûniþtin |
| **qulibandin/diqulibîne/biqulibîne** | 1.wergerandin 2.vegerandin 3.çilmisandin |
| **qulibîn/diqulibe/biqulibe** | 1. wergerîn 2. vegerîn 3.çilmisîn |
| **quling** | balindeyeke lingdirêj e *“çi tê serê qulingê, ji qajîna qulingê ye” |

| | |
|---|---|
| **qulik** | kunên biçûk *“gûmiþk, di qulikên dîwaran de pir in” |
| **qulîzên** | 1. gazî û hewariya komelî ya di demên ku bûyereke bi tirs an jî |
| **qul kirin** | nexweş rû dide; hêwirze 2. di rewşên awarte de dengê dûdika hişyariyê |
| **qul kirin** | 1.kun tê de çêkirin 2.derizandin 3.qeliþandin 4. cerx pê xistin 5.tîştîşî kirin *“baranê erd þil kir,zîpike erd qul kir” |
| **qulopanî** | destdanîna erdê û qewaztina çep an jî rast; teqle |
| **qulopanî kirin** | dest danîn erdê û bi ser an jî bin xwe re qewaztin |
| **qulopilo** | sixtopixto |
| **quloz** | 1.bilind 2.hevraz *“gotin: ‘dîno heştirme çi ye?’; got: ‘serberjêra qûn-quloz’ ” |
| **qulozan** | qulopanî |
| **quloz bûn** | 1. bilind bûn 2.hevraz bûn *“nifirên ku quloz bûneezmanan, bi şun de vedigerin xwedanan” |
| **quloz kirin** | 1.bilind kirin 2.hevraz kirin |
| **qulp** | 1. destikê girtinê yî çemberkî; çembil 2. kuna bişkojkan *“belaya xelqê ji dûrê tê, ya me ji berqulpa tûrî tê” |
| **qulpa çavan** | kortika çavan |
| **qulpa derziyê** | kunika ku şûna bendtêrekirinê ye |
| **qulp pê ve kirin** | bi îftirayekê soxî kirin |
| **qulqule** | rizde |
| **qulqulî** | 1.tîştîşî 2.kunkunî |
| **qumaþ** | pîneyê ku jê kinc û hwd tên çêkirin; pirtî |
| **ma qumaşê alê ye?** | Çira ewqas bibiha ye? |
| **Qunbere** | stêrkeke ku di nîveka havînê de dertê û pir bi şemal e; Qurix |
| **qunc** | kunc |
| **quncê jorîn** | di civatan de cihê payebilind |
| **quncal** | qulac |
| **quncik** | kuncik |
| **quncirandin/ diquncirîne/ biquncirîne** | bi tiliya beranekê û şehadetê berk guvaþtin |

| | |
|---|---|
| **quncirûk** | careke quncirandinê |
| **quraf** | tirs û xof |
| **quraftin/diqurêfe/biqurêfe** | [I] 1.badan 2. tewandin 3.guvaştin 4. tirî çinîn |
| **quraftin/diqurêfe/biqurêfe** | [II] 1. Bêhavil man 2.ji ber tirs û dehşetê bêqidûm bûn 3.jan kêşan |
| **Quran** | pirtûka pîroz a ola îslamê |
| **qurban** | 1. sewala ku ji bo Xwedê hatiye serjêkirin 2. cangorî *“ker nabe qurban, bihayê kerê dibe qurban” qurbana vî kurî, teşt firot legan kirî zarokê bêxêr, tiştê giranbiha di riya tiştê erzan de dimezêxe |
| **qurban dan** | 1.(ji bo Xwedê sewaleke ku bi kêrî qurbanan tê)ser jê kirin 2.gorî kirin |
| **qurban kirin** | gorî kirin |
| **qurcûm** | giyayê ku ber ajalan dimîne û ji bo şewateyê tê bikaranîn |
| **qure** | pozbilind |
| **qure bûn** | pozbilind bûn |
| **(xwe)qure kirin** | xwe kizeve kirin |
| **qureder** | nifrîneke di wateya “jehrê bixwe!” an jî “hiş be!” de ye |
| **qurequr** | dengê beq û zikê vala |
| **qurequr kirin** | beqê û zikê vala deng derxistin |
| **qurf** | qamîşê ku terîterî tê çinîn; levenê zirav  qurfik selik |
| **qurifandin/diqurifîne/biqurifîne** | (tiştê hişk)bi tewandinê qut kirin |
| **qurifîn/diqurife/biqurife** | (tiştê hişk) bi tewînê qut bûn |
| **Qurix** | Qunbere |
| **qurm** | 1.zikê darê yî qelew  2. gewdeyê dare *“agirê gur, di qurman de ye” |
| **qurmiçandin/diqurmiçîne/biqurmiçîne** | guvaştin û pelixandin hev |

| | |
|---|---|
| **qurmiçîn/diqurmiçe/biqurmiçe** | ji ber guvaştinê civîn û pelixîn hev |
| **qurnaz** | kone |
| **qurnazî** | konetî |
| **qurom bûn** | bêpêjn û bêtevger bûn; lev piçikîn |
| **xwe) qurom kirin** | **(**bêpejn û bêtevger bûn; xwe gilê kirin |
| **qurqurbeg** | 1.seg 2.kûçik (mêr)2.lotê (jin) *"ji heft salan salek, aîdî qurqurbegê ye" |
| **Kurê qurqurbegê** | kûçikê kurê kûçikan; segbav |
| **Qurt** | gum, fir |
| **qurtandin/diqurtîne/biqurtîne** | 1.di gewriyê de berjêr kirin 2.fir kirin |
| **qurtik** | berkurk |
| **qurût** | 1.di lîstikê de jêbirin; fît 2.peyveke ku ji sewalan re tê gotin ku avê vexwin |
| **qurût bûn** | 1.di lîstikê de jê çûn; fît bûn 2.(sewal) hucûmî avê kirin |
| **qurût kirin** | 1.di lîstikê de jê birin; fît kirin 2. (mirov) sewal bi fîtefîtê vexwendin avê |
| **qusan** | pîrotan |
| **qusandin** | |
| **qusandin/diqusîne/biqusîne** | [I] 1.kurtisandin 2.birîn |
| **qusandin/diqusîne/biqusîne** | [II] xwîn an jî şîr wekî kersengan kirin |
| **qusîn/diquse/biquse** | 1. xwîn an jî şîr kersengkersengî bûn 2.kurtisîn |
| **qut** | 1.birî 2.qetiyayî |
| **qutb** | 1.serok 2.ji hemûyan mezintir 3.cemser |
| **qut bûn** | 1.qetîn 2.jê bûn |
| **qutifandin/diqutifîne/biqutifîne** | bi tirs û xofê bêtevger hiştin |

| | |
|---|---|
| **qutifî** | kesê ku ji ber tirs û dehşetê nikare xwe tev bide |
| **qutifîn/diqutife/biqutife** | ji ber tirs û dehşetê di cih de rawestîn û neleqîn |
| **qutik** | cureyekî kincan ê bimil e; mîntan |
| **qutim** | qurmê darê |
| **qut kirin** | 1.birîn 2.qetandin 3.jê kirin *"darê,di bin xwe ve qut meke" |
| **quwet** | hêz, şiyan |
| **quz** | endamê mêzatiyê; şilepor (mirov), za (ajal) |
| **quzfiroş** | qewad, qebrax |
| **qû** | cureyekî teyran e |
| **qûç** | 1.tiştên li ser hev jenandî; gutle 2.komeke keviran 3.tijî û dagirtî *"mala zêran pûç e, mala mêran qûç e" |
| **qûç bûn** | 1. bi ser hev de kom bûn 2.tijî bûn |
| **qûç kirin** | 1. li ser hev jenîn; bi keys kirin 2.tijî kirin |
| **qûn** | 1.qul 2.kun 3.tilora ku gemara hundir davêje derve *"qûn, bi qûnkaşkê ji kîrî xelas nabe" |
| **qûn pan kirin** | 1. Qelew bûn2. niyêta rabûnê nekirin |
| **qûnê bi min re neyê, bîna genî ji te tê** | quretiya bi malbatê qebûl nekirin |
| **qûndare** | pêlavên çêrmîn ên ku nalçeyên wan darînî ne |
| **qûnde/qûnek** | 1.mêrê ku qûna xwe dide gadan; lûtî 2. jina ku mêran berdide ser xwe; qehbik, fahişe |
| **qûndetî/qûnektî** | 1.lûtîtî 2. fahiþetî, qehbiktî *"dizî bi nanekî, qûndetî bi ramûsanekî" |
| **qûnek** | qûnde |
| **qûnfireh** | 1. qûnfireh 2. bêxîret |
| **qûngiran** | qelewê teral |
| **qûntar** | bintar |
| **qûş** | bendê ku zînê hespê li binzikê girêdide *"heke nanê şil ket zikê meriyan, qûşxwe ranagirin" |
| **qûş li yekî teng kirin** | xeneq lê şidandin |
| **qûşxane** | beroşa bêçembil |

| | |
|---|---|
| **qût** | 1.xwarin 2.xurek 3. alifê mirîşkan |
| **qût xwarin û ji qûnê bûn** | faydeya bênamûsiyê dîtin |
| **qûze** | cihê ku tav jê nagire; talde |

# R

| | |
|---|---|
| **R/r** | tîpa bîst û yekemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê diranî ye, awayê belavbûna wê herikî û lerzokî ye |
| **ra [I]** | reh |
| **ra[II]** | 1.fikr, hizr 2.çare |
| **raya giştî** | fikra her kesî; ramana gelemper |
| **ra jê bûn** | çareser bûn |
| **raber** | pêşber |
| **raber kirin** | 1.rave kirin2.araste kirin 3.pêşandan |
| **rabezîn/radibeze/rabeze** | 1.êrîş kirin 2.pev çûn, lêk dan |
| **rabihartin/radibihêre/rabihêre** | 1. bi yekî re heta cihekî çûn 2. bi yekî re baş derbas kirin |
| **rabihîstin/radibîze/rabihîze** | 1.hîs kirin 2.tê derxistin 3.pê zanîn |
| **rabirdû** | raborî |
| **raborî** | 1.dema borî û çûyî 2.serpêhatî |
| **rabûn/radibe/rabe** | 1. bilind bûn 2.hilqetîn *“li mala dînan, rabûnhev bi pehînan” |
| **rabûn şek** | 1. (*sewal*) rabûn ser lingên paşîn û çik sekinîn 2. (*sewal*) li hev xistin |
| **raçandin/radiçîne/raçîne** | 1. tov reşandin 2. tevn çêkirin |
| **raçav** | bendeman |
| **raçav kirin** | payîn |
| **radan/radide/rade** | 1. Pê vedan 2. lê dan 3. gayîn |
| **rade** | 1.ast, pile 2.derece, merhele |
| **rader** | (r) mesderê lêkerê |
| **radest** | di destan de; teslîm |
| **radest bûn** | ketin destan; teslîm bûn |

| | |
|---|---|
| **radest kirin** | dan destan; teslîm kirin |
| **rageş** | kesê ku bi rageşiyê ketiye |
| **rageşî** | nexweşiyeke vekişîna rehên laşî ye û pêketiyê wê zû bi hers dibe |
| **ragihandin/radigihîne/ragihîne** | 1. şandin 2. salix dan 3.dan zanîn |
| **ragihiştin/radigihêje/ragihêje** | xwe gihandin tiştekî |
| **ragirtin** | 1. vekişandin 2.bêhnfireh bûn |
| **xwe ragirtin** | tehemul kirin |
| **raguhastin/radiguhêze/raguhêze** | ji cihekî hildan û danîn cihekî din;neql kirin |
| **rahatin/ratê/rabê** | hînî tiştekî nû bûn |
| **rahejandin/radihejîne/rahejîne** | tiştek bi tundî leqandin û hejandin |
| **rahêl** | 1.cihê rajorîn 2.devera jorîn |
| **rahêlan/radihêle/rahêle** | li pey tiştekî ketin |
| **rahiştin/radihêje/rahêje** | 1.xwarî tiştekî bûn û hildan 2.wergirtin |
| **rahiştin darê û dar bi dest ve hatin** | pir xurt bûn |
| **rajêr** | aliyê jêrê |
| **rajor** | aliyê jorê |
| **raketin/radikeve/rakeve** | 1.razan 2.paldan 3.ramedîn 4.nivistin *“gava Xwedê bide ha rakeve, ha rakeve, gava nede ha li ba keve, ha li ba keve” |
| **rakêşan/radikêşe/rakêşe** | ragirtin, vekişandin |
| **rakêşana zevînî** | hêza erdê ya ku tiştan ber bi xwe ve dikêþe |

| | |
|---|---|
| **rakirin/radike/rake** | 1.bilind kirin 2.hilkirin 3.hilqetandin |
| **rakişîn/radikişe/rakişe** | vekişîn |
| **raman** | 1.têgihiştina kar,kiryar, gotin û hwd; fikr, hizr 2.pokinîn |
| **raman û beyan** | dîtinî û şîrove |
| **ramedandin/radimedîne/ramedîne** | 1. velezandin 2.razandin |
| **ramedîn/radimede/ramede** | 1.velezîn 2.razan |
| **ramîn/dirame/birame** | 1.hizr kirin, fikirîn 2.pokinîn |
| **ramûsan** | paç*“jina xelqê ramûsanek  e, hespê xelqê meydanek e, kinca xelqê roj û danek e” |
| **ramûsandin/radimûsîne/ramûsîne** | paç kirin |
| **ramyar** | siyasetvan |
| **ramyarî** | siyaset |
| **ran** | endamê ji çokê hetanî kemaxê *"berfa hûr, xwe avête ranê stûr” |
| **ranan/radine/rane** | 1.dîwar bilind kirin 2. Sere banê avahiyekê bi keresteyê pêwist ava kirin |
| **ranik** | rana biçûk |
| **rapêçan/radipêçe/rapêçe** | 1.tiştek li tiştekî din alandin 2.paçik kirin |
| **raperişandin/radiperişîne/raperişîne** | darijtin, darotin |
| **raperîn/radipere/rapere** | 1.ser hildan 2.pêngav avêtin |
| **rapêç** | bapêç |
| **rapêçan/radipêçe/rapêçe** | li dorê alandin |

| | |
|---|---|
| **rapêçîn/radipêçe/rapêçe** | li dorê alîn |
| **rapêlk** | cureyekî haletên çandiniyê ye û pê giyayê dirûtî komî ser hev dikin |
| **rapêş kirin** | 1. nîşan dan 2. pêşkêş kirin |
| **raqetandin/radiqetîne/raqetîne** | 1. jê dûr xistin 2. jê veqetandin |
| **raqetîn/radiqete/raqete** | 1. jê dûr ketin 2. Jê veqetîn |
| **rarûyî yekî ketin** | 1. Nav tê dan 2. ji rê derxistin |
| **raser** | aliyê fêzê |
| **rasernav** | sernavê mijarê yî ku datînin jora nivîsê |
| **rasine** | weris |
| **raspartin/radispêre/raspêre** | 1.emanet kirin 2.pala xwe dan |
| **rast** | 1.neçewt 2.durist 3. heqîqet 4. meydan 5. pêşber *“mirin tê rastê, çavê tevan li revê” |
| **bi rastî** | di heqîqetê de |
| **rastî hev hatin** | 1. Pêrgî hev hatin, hev dîtin 2.hevrû bûn 3. çav pê ketin *“goşt, rastî kesê bi diran tê” |
| **rastbîn** | kesê ku heqîqetê nas dike |
| **rastek** | amûreke pîvandinê ya ku ji dar an jî lekê tê çêkirin û pê dirêjahiya xêzan tê pîvan; rastkêş |
| **rasteqîn** | heqîqî |
| **rasterast** | 1.yekser 2.derbest |
| **rasterê** | riya ku xulpî tê de tune ye û li ser ramaneke baş ava bûye |
| **rasterê bûn** | 1. ketin riya rast2. averêyî ramaneke baş bûn |
| **rasterê kirin** | 1. danîn ser riya rast 2. averêyî ramaneke baş kirin |
| **rastexêz** | xeta ku rasterast hatiye kişandin |
| **rastênhev** | xêzikên ku bi berayî dirêj dibin û bê payan in |
| **Rastgir** | Muhafezekar |
| **rastgo** | sadiq, rastbêj *“kumê rastgoyan, tim qetiyayî ye” |

| | |
|---|---|
| **rasthatin** | tesaduf |
| **rasthatinî** | tesadufî |
| **rastî** | 1.heqîqet 2.neçewtî 3.duristî *“rastî,tehl e” |
| **rastker** | kesê ku nivîsan ji aliyê rêziman, xalbendî û rastnivîsê ve sererast dike |
| **rastkêş** | cedwel, xêzkêş |
| **rast kirin** | 1.têkûz kirin 2.sererast kirin *“heke mar xwe rast neke, di kunê de naçe” |
| **rastmane** | 1. rasterast û yeksere 2. bê derew û ne qestbane |
| **rastnivîs** | (r)îmla, vekît |
| **rateqandin/raditeqîne/rateqîne** | bi darê zorê qewirandin |
| **rateqîn/raditeqe/rateqe** | xwe ber darê zorê ranegirtin û revîn |
| **rav** | 1. werzîşa girtin an jî kuştina sewalên kovî; nêçîr 2. nîşaneya ducaniya jinan a ku wekî belekiyekê di rûyê wan de xuya dibe |
| **rava** | **nîşan** |
| **ravayî yekî kirin** | nîşanî yekî kirin |
| **rave** | şîrove |
| **ravekar** | şîrovekar |
| **ravekew** | nêçîra kewan |
| **rave kirin** | şîrove kirin, îzah kirin |
| **ravgeh** | nêçîrgeh |
| **ravker** | nêçîrvan |
| **rawe** | (r) teşeya lêkerê |
| **raweyên pêşkerî** | di hevokê de teşeya demannîşan dide |
| **raweyên daxwazî** | di hevokê de karê ku tê nîgaşkirin nîşan dide |
| **rawest** | 1. navber2. careke bêhnvedanê |
| **rawestan** | sekn |
| **rawestandin/radiwestîne/rawestîne** | sekinandin |

| | |
|---|---|
| **rawestgeh** | cihê sekinînê |
| **rawestgeh dagirtina sotemeniyê** | cihê ku navgînên raguhastinê lê sotemeniyê hildigirin |
| **rawestîn/radiweste/raweste** | sekinîn |
| **raweşandin/radiweşîne/raweşîne** | 1. şek lê dan, lê xistin2. belav kirin |
| **raweşîn/radiweşe/raweşe** | 1.lê ketin 2. belavbûn |
| **rawêj** | [I] 1.texmîn 2.zen 3.bîrbirin 4. şikbirin |
| **rawêj** | [II] 1. şêwr 2.hêvotin |
| **rawêjer** | 1. şêwirmend 2. hêvojkar |
| **rawêjerê leşkerî** | şêwirmendê eskerî |
| **rawêjerî** | 1. rêwirmendê 2.hêvojkarî |
| **rawêjeriya bazirganiyê** | saziya şêwirmendiyên têkildarî ticareta navxweyî, neteweyî û navneteweyî |
| **rawêjgeh** | 1. saziya şêwr û hêvotinê 2. civata şêwr û hêvotinê |
| **rawêj kirin** | 1.pê şêwirîn 2.ji dêv axifteyeke berdar hildan |
| **rawêjî** | 1.têkildarî şêwr û hêvotinê 2. texmînî |
| **raxistin/radixîne/raxîne** | 1.danîn erdê 2.rapêşandin |
| **raxît** | bihuk |
| **raye** | 1.hêzdarî 2.desthilatî |
| **rayedar** | peywirdar |
| **rayedarî** | peywirdarî |
| **rayedariya zagonsaziyê** | peywirdariya qanûndanînê |
| **rayêl** | xeta gêreba, telefon û hwd; têl |
| **rayêl kirin** | bi dirêjahî raxistin erdê |
| **rayêx** | ferşik û raxistinên nava malê |

| | |
|---|---|
| **rayîş** | kar û barên ku her kes pê qayîl e |
| **rayîşa bazarê** | rêbaza danûstanê |
| **raz** | sir, bîs |
| **razan/radize /razê** | 1.paldan, nivîn 2.veketin, ramedîn 3.welidîn *"av û agir radizên, dijmin ranaze" |
| **razandin/rad izîne/razîne** | 1. nivandin, telexewî kirin 2.ji bo karekî dirav mezaxtin |
| **razanxane** | jûra nivistinê |
| **razber** | tiştê ku ne berbiçav e |
| **razepeyv** | peyv û nîşaneyên ragihandinê yên ku tenê ji aliyê xwediyên bikarhêner ve tên zanîn |
| **razepeyv avêtin ber** | (da ku tu kes pê nehese) jê re şifreyek çêkirin |
| **razgir** | kesê ku ragihandinên rêvebirekî bi rê ve dibe |
| **razî** | 1.pejirandî 2. qebûlkirî 3.sertewandî *"her qazî, ji xwe razî" |
| **razyane** | cureyekî çêreya ku di dermansaziyê de tê bikaranîn |
| **reben** | 1.belengaz 2.xizan, feqîr 3. bêsiûd |
| **rebenî** | 1.belengazî 2.xizanî 3. bêsiûdî |
| **rebeq** | bi hev re, li ser hev, pêk ve |
| **ev deh salê rebeq in ku** | ev deh salên li ser hev in ku |
| **ref** | 1.komeke çivîkan 2. dor 3.rêz 4. depeke ku bi dîwarî ve tê qayîm kirin û tişt li serê tên rêzkirin *"her teyr bi refa xwe re ye" |
| **refandin/dir efîne/birefîn e** | xalîçeya qulbuyî hêvîs kirin |
| **refank** | refa dîwarî |
| **refes** | çirtikavêtina sewa- lên çarpê bi lingên paşîn; lotik |
| **refes kirin** | çirtik avêtin, lotik avêtin |
| **reftar** | 1.helwest 2.tevger |
| **reg** | rehên dar û çêreyê |
| **regez** | 1.nijad, irq 2.nifþ |
| **regezperest** | neteweperest |
| **reh** | 1.kok 2.rêşî 3.rêç |

| | |
|---|---|
| **reh û rêşiyên xîretê tê de nebûn** | ji sehek û hestên rêzdariyê bêpar bûn |
| **reh lê ranebûnhêm anên** | mêraniyê tê de nebûn |
| **reha** | tiştê ku bêguman dê biqewime |
| **rehek** | nebat |
| **reheknasî** | zanistên ku pisporiya wan hêşinahiyên li ser rûyê zevînê ne |
| **rehet** | 1.aram 2.mezbût 3.bihuzûr 4.xweş |
| **rehetî** | 1. aramî 2.mezbûtî 3.bihuzûrî 4.xweşî *“nizanim, rehetiya can im” |
| **rehidandin/d irehidîne/ birehidîne** | 1. êşandin 2. azirandin |
| **rehidîn/direh ide/birehide** | 1. êşîn 2. azirîn |
| **rehilandin/di rehilîne/ birehilîne** | lerizandin |
| **rehilîn/direhi le/birehile** | lerizîn |
| **rehik** | di lêş de riyên xwînê yên ziravik |
| **rehjen** | avêtina dilê sax; nebiz |
| **rehjenî** | avêtina dilê giyaneweran |
| **rehn** | 1.nerm 2. şil 3.ava wê zêde *“girara rehn, ji kêmdanî ye” |
| **rehnayî** | 1.nermî 2. şilayî3.avî |
| **rehn bûn** | 1.nerm bûn 2. şil bûn 3.ava wê zêdebûn |
| **rehn kirin** | 1.nerm kirin 2. şil kirin 3.av lê zêde kirin |
| **rejî** | **ge**randina karekî ji aliyê kesekî an jî komekî ve |
| **remezan** | di îslamê de meha rojîgirtinê |
| **remil** | 1. xîz, teqn 2. fal |
| **remildar** | falavêj |
| **remz** | nîşane |
| **renc** | 1. azar, eziyet 2.ked 3. şkênc |

| | |
|---|---|
| **rencber** | 1. kedkar, zehmetkêş 2.sexbêrê sewalan û çandiyar *“rencber û maldar, nabin hemwar” |
| **rencîde** | azardîtî |
| **rencîde kirin** | azar lê kirin |
| **rencûr** | xembar |
| **rende** | kartîk |
| **rendol** | kinca ku bi pûş tê tijî kirin û di ber bîstanan de tê çikilandin da ku mirov bê hesibandin û jê bê tirsîn |
| **reng** | 1. boyax, gûn 2.celeb, cure, awa *“destê dê, reng û rûyê qîzê ye” |
| **rengandin/direngîne/birengîne** | boyax kirin |
| **rengavêtî** | 1. Gewrotankî 2. verêtî 3.zibilî |
| **rengdêr** | (r) peyvên ku rewşa heyberan dinmînin; hevalnav |
| **rengîn** | boyaxkirî |
| **rengkorî** | şevekorî |
| **rengpîşe** | hoker |
| **rengrêj** | 1. kesê ku bi rengan tiştan direngîne 2.boyaxa qumaşî |
| **renî** | sêlava berfa heliyayî |
| **renîn/direne/birene** | alaveke zivir bi ser tiştekî re xişandin û girnozên wî jê birin |
| **renok** | alaveke mitbexê ya ku pê penîr sewze û hwd tên hûrkirin |
| **rep** | 1.req 2.çik, vît 3.zoq |
| **repandin/direpîne/birepîne** | 1. lê xistin2. vepelîn ber |
| **rep bûn** | 1.req bûn 2.çik rast bûn |
| **reperep** | 1. dengê domdar ê mêşîna giyanewereke girs 2.dengê domdar ê lêdana tund |
| **reperep kirin** | 1. Dengê meşîna giyanewereke girs hatin 2.li ser hev û bi tundî li tiştekî xistin |
| **episandin/direisîne/birepisîn** | tepisandin |
| **repisîn/direpise/birepise** | tepisîn |

| | |
|---|---|
| **req [I]** | kûsiyê avê |
| **req [II]** | sext, hiphişk |
| **req bûn** | hişk û rakişandî bûn |
| **reqbûna rehçikan** | hişkbûn û rakişîna rehên xwînê |
| **req kirin** | hişk û rakişandî kirin |
| **reqas** | 1. semajen 2. lotikavêj *“kesê ku ne di govendê de be, fît reqas e” |
| **reqele** | 1. hejar 2.yax |
| **reqem** | jimare |
| **reqisandin/direqisîne/bireqisîne** | 1.rakirin cergebezê 2.lotik dan avêtin *“heke xwedanê malê li defê bide, dê biçûkan bireqisîne” |
| **reqisîn/direqise/bireqise** | 1. lîstin 2.lotik avêtin *“ew ber defa bêdeng jî direqise” |
| **reqitîn/direqite/bireqite** | 1. (erd) av hilçinandin xwe 2. ziwa û hişk bûn |
| **reqs** | 1.cergebez 2.lîstik û şahî 3.lotik |
| **resen** | 1. eslî 2. xwerû, xwemalî |
| **reş** | rengê qîr û qetranê *“bextê reş,tim ê xwedî ye” |
| **reş û peş kirin** | çav tirsandin |
| **reş girêdan** | 1.(ji bo mirinekê)giramî nîşan dan 2.kincên reş (ên ku elameta şînê ne)li xwe kirin |
| **reşahî** | 1. temtêla rengê qîr û qetranê 2. reşî |
| **reşandin/direşîne/bireşîne** | 1.belav kirin 2. rijandin |
| **reşbelek** | name, mektûb |
| **reşbîn** | kesê ku bûyerê bi neyînî dinirxîne |
| **reş bûn** | 1. rengê reş lê xuya bûn 2.qemirîn |
| **reşe** | 1. elametên nenas ên ku ji ber tirs û xeyalan li ber çavên mirovî dikevin 2. rendol |
| **reşeba** | bayê jêrîn |
| **reşedar** | di zivistanan de temtêla bêbelgbûna darên daristanan |

| | |
|---|---|
| **reşekurmancî** | 1.ji çanda kurdan hûnandî 2. Ji sedî sed kurdî |
| **Reşemî** | meha duyem a salnameya zayînî |
| **reşenivîs** | nivîsa ku di asta amadehiyê de ye nehatiye têkûzkirin; muswede |
| **reşêle** | cureyekî çivîkên ku dişibihin qijikan lê ji wan biçûktir in |
| **reşik [I]** | 1.zencî 2.reşe *"filan keso reşikê şevê ye" |
| **reşik [II]** | bîbika çavî |
| **reşik [III]** | cureyekî çêreya ku tevî toraqê dikin |
| **reşî** | erdê ku lê berf nebariye an jî berfa wê ya heyî heliyaye |
| **reş kirin** | 1. bi rengê reş rengandin 2. xêzeke reş kişandin ser nivîsekê |
| **reşnivîs** | reşenivîs |
| **reşokî** | cureyekî tifingên kevn e |
| **reşpoşî** | kesê ku di şînekê de kincên reş li xwe dike û xemgîniya xwe diyar dike |
| **reşreşk** | 1. bîbika çavî 2. bihareteke dendikreş û hûrik e |
| **rev** | 1. firar 2.bez 3.mişextîkarî *"cih heye, rev ji mêraniyê çêtir e" |
| **revandin/direvîne/birevîne** | 1.bezandin 2.jê standin 3.bi lezgînî hildan û birin |
| **revaştin/direvêşe/birevêşe** | kotin |
| **revde** | keriyê gur û kûçikan |
| **revend** | 1. kesê ku ji welatê xwe bi dûr ketiye 2. civat 3.komel |
| **revenda kurd** | kurdên ku li derveyî welêt dijîn |
| **revêtin/direvêje/birevêje** | (ji bo teşedanê) dar darijtin |
| **revî** | kerî, revde |
| **revîn/direve/bireve** | bezîn *"agir berda malê, |
| **revî** | xwe da palê" |
| **revîrevî** | bi lez û bez |
| **bi revîrevî çûn** | di navbera meş û bezê de bi rê ve çûn |
| **revok** | 1.firarî 2.mişextî |

| | |
|---|---|
| **revrevk** | sîtavk û elametên ku li ber çavan peyde dibin; serab, leylan |
| **rewa** | 1.bi serbestî bikaranîna mafekî 2.tişt, gotin û kiryar ên qanûnî yên ku mafê mirovî heye pê rabe; meşrû, cayîz |
| **rewa bûn** | 1.serbest bûn 2.meşrû bûn, cayîz bûn |
| **rewal** | nûciwanê ku hîna simbêlên wî derneketine |
| **rewan** | 1. şareza 2. Tiştê ku diherike; herk 3. jiyana domdar |
| **rewanbêj** | kesê ku di hûnandina peyv û hevokan de şareza ye û li gorî rêzimana wî zimanî nakeve çewtiyan; fesîh |
| **rewanbêjî** | fesahet |
| **rewan bûn** | hîn bûn |
| **rewanî** | şarezatî |
| **rewan kirin** | hîn kirin |
| **rewatî/rewayî** | qanûnî, meşrûtî |
| **rewd** | komasiya hesabekî |
| **rewend** | koçer, çolger |
| **rewendî** | koçerî, çolgerî |
| **rewêl** | ajala jakaw |
| **rewiqandin/direwiqîne/birewiqîne** | hesp bezandin |
| **rewisandin/direwisîne/birewisîne** | 1. kizirandin 2.çilmisandin |
| **rewisî** | 1.kizirî 2.çilmisî |
| **rewisîn/direwise/birewise** | 1.por û pirç şewitîn, kizirîn 2.çilmisîn, zibilîn *“quzê ku par rewisiye, îsal jî bêhn dikevê” |
| **rewişt** | 1.sinc 2.xwî û xislet 3.dab û nêrît 4.exlaq |
| **rewişta kurd** | xwî û xisletên kesayeta kurdan |
| **rewneq** | 1.îhtişam 2.kawîtî 3.şemal û ronahî |
| **rewneqdar** | 1.muhteşem 2.kaw 3.bişemal û ronîdar |
| **rewş** | 1.temtêl 2.werz 3. hal *“neyar bi rewşa neyêr nizane” |

| | |
|---|---|
| **rewşa awarte** | temtêla ku ne asayî ye |
| **rewşen** | ronak |
| **rewşenî** | ronahî *“kincên baş, rewşeniya dinyayê ne” |
| **rewşenbîr** | ronakbîr |
| **rewt** | şiva dirêj |
| **rex** | 1.kêlek, alî, ta 2.tûş |
| **rex û çan** | derûdor |
| **li rex û çanên xwe nihêrtin** | li der û dora xwe mêze kirin |
| **rexne** | destnîşankirina şaşiyan û dîyarkirina riya çareserkirinê; tenqîd |
| **rexneya avaker** | rexneya ku ji bo başkirina temtêlê tê kirin |
| **rexneya kavilker** | rexneya ku bi mebesta ajaweyê tê kirin |
| **rexnegir** | şarezayê rexneyê |
| **rexnegirî** | şarezatiya rexneyê |
| **rexne lê kirin/lê girtin** | tenqîd kirin |
| **rext** | fîşengdank |
| **reyîn/direye /bireye** | 1.ewtîn 2. çeleçel  kirin *“kûçik ji kî aliyî bitirse, wir de direye” |
| **rez** | 1.bax 2. baxê tiriyan *“bihar û havînê rez, zivistanê jî pez” |
| **rezalet** | rezîltî |
| **Rezber** | meha nehemîn a salnameya zayînî |
| **rezîl** | kesê ku karekî nebaş kiriye û rûmeta wî zede girtiye |
| **rezîl bûn** | li pêşberî xelqê bêrûmet û bêqedr bûn |
| **rezîl kirin** | li pêşberî xelqê bêrûmet û bêqedr kirin |
| **rezîltî** | rewşa ku kesê rezîl ketiyê; riswatî |
| **rezvan** | baxvan |
| **rezvanî** | baxvanî |
| **rê** | 1. cihê ku tê de karê çûn û hatinê pêk tê 2.azîne 3.fesal 4.huner *“çiyayê bilind, bê berf û rê nabin” |
| **rê dan** | destûr dan |

| | |
|---|---|
| **bi rê ketin** | dest bi meşê kirin; derketin seferê |
| **bi rê ve birin** | îdare kirin |
| **bi rê ve çûn** | meşîn |
| **rêbaz** | 1. qayde 2.fesal 3.azîne |
| **Rêbendan** | meha yekemîn a salnameya zayînî |
| **rêber** | serokê rêvebir; serkêş *“aqil, rêberê merivan e“ |
| **rêberî** | rêzanî, serkêşî |
| **rêberî kirin** | serkêşî kirin, rê nîşan dan |
| **rêbir [I]** | rêber, rênîşandêr *“texmîn  rêbir e, aqil hakim e” |
| **rêbir [II]** | eşqiyayê ku riya xelqê dibire û wan dişêlîne |
| **rêbirî** | 1. serkêşî 2. eşqiyatî |
| **rê birîn** | li ser cihê çûn hatinê astengî çê kirin |
| **rêbiwar** | rêwî |
| **rêbiwarî** | rêwîtî |
| **rêç** | 1.şop 2.dewsa piyan |
| **rêç gerandin** | şop gerandin |
| **rêç kirin** | li pey hev rêzkirin |
| **rêçal** | jajî |
| **rêçalî** | xwarinên wek mast, penîr, jajî û hwd; spîtahî |
| **rêder** | 1. kesê ku destûra kirina kar û çalakiyekê dide2. cih an jî riya derketinê |
| **rêgeh [I]** | bihurgeh |
| **rêgeh [II]** | guzergeha gerestêrkan |
| **rêgez** | 1.qayde 2.fesal |
| **rêgir** | rêbir |
| **rêhesin** | riya şemendefiran a ji zamokan pêkhatî |
| **rêje** | 1. nisbeta hejmarî 2.jê parçeyek |
| **rêjgeh** | 1. cih, ger an jî çala ku av dirijê 2. şîp, şelale |
| **rêjing** | 1. çeka ku fîşengan li pey hev davêje  2. qulik |
| **rêjî kirin** | maliştin |
| **rêjkar** | kesê ku tiştan di qaliban de ro dike |
| **rêjkarî** | karê di qaliban de rokirina tiştan |
| **rêjne** | taviya baranê |

| | |
|---|---|
| **rêjnebaran** | barana gur û boş |
| **rêjîk** | çeka agirber a ku dikare li ser hev çendek guleyan biteqîne |
| **rêkeft** | peyman |
| **rêkeftname** | metnê peymanê |
| **rêk û pêk** | 1.bipergal 2.têkûz |
| **rêl** | daristan *"agir bigire rêlê, ter û hişk dê pêk ve bişewitin" |
| **rênc** | jana masûlkeyan; xamî |
| **rêncî** | rewşa jandana masûlkeyan a ji ber westanê; xam |
| **rêncî bûn** | (masûlke)ji ber westanê ajinîn; xam bûn |
| **rêncî kirin** | masûlke bi westanê êşandin; xam kirin |
| **rênîşandêr** | rêber |
| **rêpî** | xerc û mesrefa rê |
| **rêpîvan** | 1.qayde 2.meş |
| **rêsî** | xuroma girêdayî; balî |
| **rêstin/dirêse /birêse** | 1.ta û bend hûnan 2.ta bi teşiyê çêkirin *"gava dewlet birêse, ga golikê dadilêse" |
| **rêşî** | bendên ku ji ber firêta tevnê mane û bi tiştê hûnandî ve daliqî mane *"konê bêrêşî, ji konan der e" |
| **rêş kirin** | darotin |
| **rêşte** | nifş |
| **rêtin/dirêje/ birêje** | 1.tiştê avî belavî erdê kirin 2. her çi hebe belavî erdê kirin *"ava miriyan,merêje nava deriyan" |
| **rê û rêçik** | usûl û qayde |
| **rê û rêçikên ayînî** | usûl û qaydeyên pêkanîna îbadetan |
| **rêv** | pirça berzikê |
| **di çata rê de rêv rûçikandin** | 1. di eşkeretiyê de karên şermê pêk anîn 2. bêminet tevgerîn |
| **rêvaz** | ribês |
| **rêveber** | 1.desthilat 2.rêberê saziyekê |
| **rêveberê pêwendiyan** | kesê ku di sazî an jî dezgekî de têkiliyan bi rê ve dibe |
| **rêveberî** | 1. Desthilatdarî 2.rêberî |

| | |
|---|---|
| **rêveberiya herêmî** | desthilatdariya di destê devereke welêt de |
| **rêvin** | gemar |
| **rêvin bûn** | gemar bûn |
| **rêvin kirin** | gemar kirin |
| **rêwişt** | 1. mîzac, xeyset, xislet 2.serinc, taybetmendî |
| **rêwing** | rêwî |
| **rêwingî** | rêwîtî |
| **rêwî** | 1.misafir 2.mêvanê rê *“bi şevê rêwiyê sere riyan, qeda li ber piyan” |
| **rêwîtî** | misafirtî |
| **rêx** | gemara heywanan *“golik diçin, rêxa xwe li cem gayê mezin dikin” |
| **rêxistin** | 1.tevger 2.sazî |
| **rêxok** | 1. qûngemar 2.qûngincî |
| **rêxokî** | rewşa îshalê ya ku bergiriya wê dijwar e *“çêlekeke rêxokî, garanê dilewitîne” |
| **rêxole** | rodiya qalind |
| **rêxazî** | rêxokî *“çêleka rêxazî, navê garanekî garanê xera dike” |
| **rêz [I]** | 1.dor 2.şîştir 3. setra nivîsekê 4.çarîna helbestê |
| **rêz bûn** | ketin dû an jî kêleka hev |
| **rêz kirin** | dan pey an jî kêleka hev |
| **rêz [II]** | 1.giramî, hurmet 2.qedrdanî |
| **rêz girtin** | 1. giramî nîşan dan, hurmet kirin 2.qedr dayîn |
| **rawestana rêzgirtinê** | temtêla giramînîşandanê |
| **rêzan** | 1.murşid, rêber 2.rênîşandêr |
| **Rêzanan** | Rezber |
| **rêzbendî** | keyskirina mijaran li gorî rêbazekê; tesnîf |
| **rêzbend kirin** | senifandin, ji hev deranîn, vawêr kirin |
| **rêzdar** | birêz, muhterem |
| **rêzepirtûk** | 1. çend pirtûkên di mijarekî de 2.çend pirtûkên heman nivîskarî |
| **rêzgir** | kesê ku giramiyê digire |
| **rêzik** | 1.setra nivîsê 2.qanûn |
| **rêzikşikên** | derveyî rayîşa asayî |

| | |
|---|---|
| **rêzil** | zincîr |
| **rêziman** | (r) hemû rê û rêçikên rastaxaftin û rastnivîsandina zimanekî |
| **rêzimanî** | nivîsar û gotara ku li gorî rêçikên zimên hatiye derbirin |
| **rêzikname** | zagon-name |
| **rêziman** | navê giştî yêhemû rê û rêçikên zimanekî ye |
| **rêzîn** | 1. di rêzê de 2. cureyekî solên erzan ên ku pale û rencber pê dikin |
| **rêz kirin** | 1. li pey hev danîn 2.rêç kirin 3.kirin şîştirê |
| **rêzname** | nivîsara fermî ya ku karê rewa yê endam û bernameyên her rêxistinekê tê de hatiye çespandin |
| **ribês** | cureyekî çêreya çêjtirş a ku terîterî tê xwarin |
| **ricifandin/diricifîne/biricifîne** | 1.lerizandin 2.hejandin |
| **ricifîn/diricife/biricife** | 1.lerizîn 2.hejîn |
| **ricimandin/diricimîne/biricimîne** | 1.(zinakar) bi kevirkirinê kuştin; kevir kirin 2.şermezar kirin |
| **ricricîn/diricrice/biricrice** | soromoro bûn |
| **riçilandin/diriçilîne/biriçilîne** | xurekekî rehnevîçkî çêkirin |
| **riçilîn/diriçile/biriçile** | xurekekî rehnevîçkî çêbûn |
| **rifse** | erdê avî yê ku ne dêm e |
| **rih** | pirça rû *“aqil di seriyan de ye, ne dirihan de ye” |
| **rih berdan** | pirça rûyî dirêj kirin û kur nekirin |
| **rih kur kirin** | pirça rûyî tiraş kirin |
| **riha** | 1.rizgarî 2.felat 3.serfirazî |
| **riha bûn** | 1.rizgar bûn 2.filitîn 3.serfiraz bûn |
| **riha kirin** | 1.rizgar kirin 2.filitandin 3.serfiraz kirin |
| **rihan** | cureyekî çêreya bêhnxweş a ku tevî toraq, penîr û xurekan dikin |
| **rihet** | aramdar |

| | |
|---|---|
| **rihet bûn** | arimîn |
| **rihetî** | aramdarî |
| **rihet kirin** | 1. Arimandin 2. jan birîn 3. bi dilê xwe lê dan |
| **rijandin/dirijîne/birijîne** | 1. rêtin 2.(tiştên avî)herikandin, ro kirin |
| **rijd** | îsrar |
| **rijd bûn** | bi îsrar bûn |
| **rijde** | rişte |
| **rijdî** | rewşa îsrarkirinê |
| **rijîn/dirije/birije** | (tiştên avî) herikîn, ro bûn |
| **rijî [I]** | ariya tiştên şewitî |
| **rijî [II]** | gerandina karekî ji aliyê kesekî an jî saziyekî ve; rejî |
| **rijî [III]** | 1.bêrûn 2.tisî |
| **rik** | 1.înad, engir 2.înk 3.hêrs *"merivê aqilsivik, tu cara li neke rik" |
| **ji rikan** | ji ber înad û hêrsê |
| **rikane** | bi înadî |
| **rikdar** | 1.înkdar 2. Engirî 3.hêrshatî |
| **rikeber** | 1. hevrik2. rijdbûyî |
| **rikeberî** | 1.hevrikî 2.înkdarî |
| **rikeh** | qefesa ku kewan dikinê |
| **rikêb** | zengiya zînê hespan |
| **rikêbî hev kirin** | êrîşî hev kirin |
| **riko** | 1. înadkar, engirok 2.înkdar 3.hêrshatî |
| **rikrikîn/dirikrike/birikrike** | 1.ricifîn 2.lerizîn |
| **rim** | cureyekî lomê cengî yê berê ye; mizreq |
| **rimandin/dirimîne/birimîne** | herifandin |
| **rimbaz** | şervanê ku lomê cengî bi kar tîne; mizreqbaz |
| **rimj** | ewr |

| | |
|---|---|
| **rind** | 1.bedew 2.delal |
| **rindî** | 1.bedewî 2.delalî |
| **rinek** | amûreke paqijkirinê ya ku bi serê wê ve porçeyek heye û ji bo pir mebestan tê bikaranîn |
| **ringering** | dengê lêxistin û qirçîniyê |
| **ringering kirin** | qîrçeqîrç kirin |
| **ripin** | 1. qevd, baq 2.gurz |
| **ripinîn/diripine/biripine** | (giya û dar) rehên wî/wê pir û bi xurtî di erdê de çûn *”giya, li ser binê xwe diripine” |
| **riprût** | 1. bêkinc2. bêdirav3. bêgiya4. bêgoşt |
| **risas** | cureyekî madenan e |
| **risasî** | rengê gewr ê birqonek |
| **risil** | îsil |
| **rist** | 1.peywir 2.setra nivîsê 3.werisê ku kincên şûştî li serê tên raxistin |
| **riste** | 1. hevok2. Pexşana birêkûpêk |
| **ristin/dirêse/birêse** | rêstin |
| **risti** | 1. stûvank, gerdenî 2.helbest |
| **rist kirin** | li gorî rêgezekê keys kirin |
| **riswa** | 1.rezîl 2.şermezar 3.bêxîret *“ew kesê ku di bin xwe re li kesan binêre, ew tim rezîl û riswa ye” |
| **riswa bûn** | 1.rezîl bûn 2.şermezar bûn 3.bêxîret bûn |
| **riswa kirin** | 1.rezîl kirin 2.şermezar kirin 3.bêxîret kirin |
| **riswatî** | 1. rezîltî2.şermezarî 3. bêxîretî |
| **rişk** | hêkên spiyan |
| **rişkîn** | kesê ku spî û hêkên spiyan ketine nav pore wî |
| **rişk kirin** | spiyê hêk kirin |
| **rişte** | cureyekî xwarina ku ji hevîrê wekî bendan qutkirî tê çêkirin; rijde |
| **rişwet** | bertîl |
| **ritam** | lîl |
| **ritil** | mengiraniyeke bi qasî heşt kîloyan e |
| **ritl** | her du gunên nêrzayan |

| | |
|---|---|
| **ritlo** | kesê ku gunên wî werimîne |
| **ritlo bûn** | gunikî bûn |
| **ritloyî** | gunikî |
| **ritimandin/diritimîne/biritimîne** | 1. xitimandin 2.tepisandin hev |
| **ritimîn/diritime/biritime** | 1. xitimîn 2. Tepisîn hev |
| **rivişt** | netewe, nifş |
| **rivîn** | 1.alaf 2.holepîtik |
| **riwange** | 1.çepera nêrînê 2.tûşa mêşa çekekê |
| **rizandin/dirizîne/birizîne** | 1. peritandin 2.kevn kirin 3.terkî mirinê kirin |
| **rizbe** | toqeya kemberê |
| **rizde** | menteşeya deriyan; qulabe |
| **rizgar** | 1. filitî 2. serfiraz |
| **rizgar bûn** | 1.filitîn 2.serfiraz bûn |
| **rizgarî** | 1.felat 2.serfirazî |
| **rizgar kirin** | 1. serfiraz kirin 2.riha kirin |
| **rizinde** | rizde |
| **riziyayî** | 1.peritî 2.kevn *“dermanê diranê rizyayî,kişandin e” |
| **rizîn/dirize/birize** | 1.peritîn 2.kevn bûn |
| **rîçal** | rehçikên dar û çêreyê yên di bin erdê de |
| **rîp** | 1.fêl, gilor 2.dek û dolab |
| **rîs** | tayê ji liva û hiriyê |
| **rîs rêstin** | (bi teşiyê ji liva û hiriyê)ta çêkirin |
| **rîş** | kînor, kunêr |
| **rîşê mirovxur** | şêrpence/penceşêr |
| **rîtil** | pîne û potik; kincik |
| **rîtin/dirî/birî** | 1.(mirov) gemar kirin, gû kirin 2. (dewar)silepor kirin, rêx kirin 3.(çivîk) zîrç kirin 4.(pez)bişkul kirin 5.(ker û hesp) ters kirin, terskul kirin 6.(se, gur, rovî û hwd) pîsî kirin *“aqile kurî, se tê de birî” |
| **dûrî xwe rîtin** | bi quretî tev gerîn, xwe kizeve kirin |

| | |
|---|---|
| **rîvele** | çermikê pir ziravik û tenik |
| **ro** | roj *“kinca hevalanro û danek, hespa hevalan bez û meydanek” |
| **robar** | çem, rûbar |
| **rodî** | doran, nûbar *“kula sê, dirodiyê gur de ye” |
| **roj** | 1.24 saetên demê 2.demên ku tav tê de xuya dibe *“filan keso, çav li roja reş e” |
| **bi roj** | wexta ku tav heye û neçûye ava |
| **bi şev û roj** | bi sibeh û êvarê |
| **roj dîtin** | 1. halxweş bûn 2. dewlemend bûn |
| **rojane** | 1. heroj, hero 2.destheqa ku ji bo keda rojeke karkerekî tê dayîn 3.karê ku her roj pêk tê |
| **rojanî** | destheqa keda rojekê |
| **rojava** | tûşa ku tav tê de diçe ava; xerb |
| **rojavayî** | 1.kesê ku ji parzemîna ewropa û emerîkayê ye; xerbî |
| **rojbaş** | ! beyanîbaş |
| **rojbend** | çerxa ku gerestêrk û cismên esmanî ên din tê de digerin; rojgar |
| **rojcebîn** | enîroj |
| **rojev** | bernameya wê rojê |
| **rojgar** | çerxa demê |
| **rojgeran** | gerestêrk |
| **rojgîn** | kesê ku tenê roja ku tê de ye hesab dike |
| **rojhilat** | tûşa ku tav tê de hiltê; şerq |
| **rojhilata navîn** | der û dorên Mek, Medîne û Qudsê |
| **rojhilatî** | kesê ku ji parzemîna asyayê ye; şerqî |
| **rojimêr** | salname |
| **rojing** | bixêrî |
| **rojik** | edese |
| **rojî** | ji berbangê hetanî êvarê dûrketina ji xwarin, vexwarin û têkiliyaç zayendî; mang |
| **rojî girtin** | (ji berbangê heta mexrebê ji xwarin, vexwarin û têkilîdanîna zayendî)dest berdan |
| **rojname** | weşana rojane ya bûyeran |

| | |
|---|---|
| **rojnameger** | kesê ku pîşeya wî rojnamegerî ye;rojnamevan |
| **rojnamegerî** | pisporiya weşanên demdiyar |
| **rojnivîsk** | nivîsarên ku li gorî mêjûyên pêkhatina wan hatine hûnandin |
| **role** | zarok |
| **Rom** | 1. kesê romayî2. şeşerûtên niha li ser axa romayiyên berê rûdinin *“hukumdarê Romê, hevalê segan e” |
| **Roma** | dûgeleke dîrokî ye û navenda wê li Ewropayê bû |
| **ron** | 1.birqonek 2.vekirî 3.şil û avî 4. aşkera |
| **ronahî** | şewq û şemala ku tarîtiyê winda dike *“av |
| **ronahî** | ye, ji avê metirse” |
| **ronak** | 1.birqonek 2.zelal 3.rewşen |
| **ronakbîr** | rewşenbîr |
| **rondik** | hêstir |
| **ronî** | 1.beraq 2.rewşen 3. cêreyan/gêreba |
| **ronîdar** | rewşen |
| **ronyas** | cureyekî çêreya ku jê boyax tê bidestxistin |
| **rop** | dewleta romê |
| **ropo** | romayî |
| **roqroqe** | lingdirêj |
| **roro** | 1.heroj 2.roj bi roj |
| **rovî** [I] | cureyekî heywanên çolê ye û bi konetiya xwe ve navdar e *“navê gurgî derketiye, roviyî dinya xera kiriye” |
| **rovî [II]** | rodî, doran |
| **rox** | xweliya hişk |
| **rozî** | rizq |
| **rubad** | nêrekew |
| **ruh** | pifa ku li ber hemû giyaneweran e û pê dijîn; giyan |
| **ruhistîn** | melkemot (melekê mewtê ango mirinê); Ezraîl eleyhiselam |
| **ruhvegerîn** | jîndarbûna piştî mirinê |
| **rux** | ser û çav |
| **ruxsar** | rûsar, xemsar |

| | |
|---|---|
| **rû** | 1.ser û çav 2.ser û sîçe 3.sikûm 4.dêm *“bila rûyê mirovî bêşê, lê zikê mirovî neêşê” |
| **rû jê badan** | jê çerixîn |
| **rû spî bûn** | beraet kirin,bêrî bûn |
| **rûbar** | ava ku di çeman de dikişe; robar |
| **rûbarên seholîn** | çemên qeşayî |
| **rûbalgeh** | pîneyê ku dikêşin ser balgehî |
| **rûber** | endazeya dirêjahî û berahiya cihan |
| **rûbirtin/rûdi bire/rûbibire** | 1. hûrhûrî kirin 2.girnoz jê birin |
| **rûçik** | sikûm, sîma *“nan, bi rûçikan tê xwarin” |
| **rûçikandin/d irûçikîne/bir ûçikîne** | 1.pûrt jê kirin 2.verûtin 3.destverû kirin 4.şêlandin |
| **rûçikîn/dirûç ike/birûçike** | 1.pûrt jê daweşîn 2. herişîn |
| **rûdan [I]** | bûyer |
| **rû dan [II]** | 1.qewimîn 2.şûm kirin, nehs kirin |
| **rûdemî** | rojane |
| **rûgeh** | qible |
| **rûgehnas** | amûra ku di seynika wê de tîrkeyeke miqnatisî heye û herdayîm cemsera bakurî nîşan dide û pê îstiqamet tên naskirin; qiblename |
| **rûgerm** | xwîngerm, sergerm |
| **rûgeş** | devbiken |
| **rûgêr** | nehs, şûm |
| **rûken** | 1.dilgeş 2.xweşik 3.devbiken |
| **rûmet** | 1.şeref 2. Giramî 3.hêjatî 4.rêz *“keça malê bi rûmet e, karê wê bê minet e” |
| **rûmetdar** | 1.bişeref 2.biheysiyet 3.hêja 4.birêz |
| **rûn** | zêt, bizir, don |
| **rûnê genî li ser nanê xwe dîtin** | bi qezenceke kirêt ve şa bûn û forte xwe kirin |
| **rûnas** | kesê ku pir caran hatiye dîtin û her kes qelafetê wî nas dike |

| | |
|---|---|
| **rûnbirêjk** | 1. tawe 2.boçesêlîn |
| **rûndank** | amana ku rûn dikinê |
| **rûnerm** | bêhnfireh |
| **rûniştin/rûdine/rune** | 1.danişîn, nîştin 2.niştecih bûn |
| **rûn kirin** | zêt kirin, bizir kirin |
| **rûnpêj** | tawe, rûnbirêjk |
| **rûpel** | aliyekî kaxezê; sahîfe, per |
| **pergala rûpelan** | di malperê de awayê ku berg hatine amadekirin |
| **rûpûş** | her tiştê ku rû vedişêre |
| **rûreş** | 1.şermezar 2.bêheya 3.riyakar, durû 4.qelbezan |
| **rûreş bûn** | şermezar bûn |
| **rûreşî** | şermezarî |
| **rûreş kirin** | şermezar kirin |
| **rûro** | ruyê ku wekî kilora rojê ye |
| **Rûs** | rût û repal |
| **rûsar** | 1.rûtirş 2.bêmizêc,bêmehde |
| **rûspî [I]** | 1.serek 2.zana 3.kemilî |
| **rûspî [II]** | 1. bêtawan 2. xwedanrûmet |
| **rûspîtayî** | rûspîtî |
| **rûspîtî [I]** | 1.serwerî 2.zanatî 3.kamilî |
| **rûspîtî [II]** | 1.bêtawanî 2.birûmetî *“keça baş, rûspîtiya bavê xwe ye” |
| **Rût** | 1.repal, uryan 2. Erdê vikvala 3. malketî |
| **rût bûn** | 1. repal bûn 2. (erd) bêçêre bûn3.îflas kirin |
| **rûtirş** | bêmirûz, pirçî |
| **rûtî** | hejarî |
| **rût kirin** | 1. kinc jê xistin 2. qalik jê qeşartin 3.şêlandin 4. di qimarê deher tişt jê birin |
| **Rûv** | 1.rêv 2.navran, berzik |
| **rûvî** | endamê ku gemara di aşikê de dikêşe derveyî cendêk; rodî, doran |
| **rûviyê barik** | dorana ziravik |
| **Rov** | pirça berzikê; rêv |

| | |
|---|---|
| **rûxandin/dirûxîne/birûxîne** | 1. Hilweşandin 2.texrîb kirin |
| **rûxîn/dirûxe/birûxe** | 1. hilweşîn 2. xera bûn |

# S

| | |
|---|---|
| **s/S** | tîpa bîst û duyemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê diranî ye û awayê belavbûna wê fîzek û hişk e |
| **Sa** | sîber |
| **sabit** | 1. di cih de sekinî2. neguherbar |
| **sabit bûn** | 1. neleqîn 2.neguherîn |
| **sabit kirin** | 1. Şidandin 2. qayîm kirin |
| **sabûn** | bûjena kefdar a ku pê tişt tên şûştin |
| **sabûna yekî kef nedan** | bi kêrî têkilîdanînê nehatin |
| **sabûn kirin** | bi sabûnê şûştin |
| **sabûnpêj** | hilberînerê sabûnê*“lep qirêj, gep qirêj, nav danînê: sabûnpêj” |
| **sabûnpêjî** | karê hilberandina sabûnan |
| **sabûnsaz** | sabûnpêj |
| **sade** | 1. tiştê yekreng û yekcure; xwerû 2. mutewazî |
| **sadetî** | 1. xwerûtî2. mutewazîtî |
| **sadiq** | 1. rastgo 2. wefadar |
| **sadiq bûn** | 1. rast gotin 2.bi wefa bûn |
| **saet** | demjimêr, katjimêr |
| **saet li ser yekî nehatin girêdan** | zû biryara xwe guherandin |
| **safî** | 1. zelal 2. paqij *”tu dilê safîbavêjî êgir, agir pê nakeve” |
| **sakar** | sade |
| **sakarî** | sadetî |
| **sako** | kinceke zivistanî ya stûr e û hetanî ser lingan dadikeve |
| **sal** | 12 meh an jî 365 roj *“arvanê salê, bi salê re diçe” |
| **sal heye duwazdeh meh e ew di wî halî de ye** | (erênî û neyînî) ew kes salewext li ser heman temtêlê ye |

| | |
|---|---|
| **salane** | 1.her sal 2.serpêhatiya 365 rojên borî 3.derameta ku di saluki de tê bidestxistin |
| **salar** | serfermandar |
| **salewext** | pêvajoya 365 rojan |
| **salix dan** | 1.ragihandin 2. agehî dan |
| **salixgerî** | 1. îstixbarat 2.sîxurî, casûstî |
| **salname** | teqwîm |
| **salos** | kesê ku bi nebaşan re radibe û rûdine |
| **salroj** | salveger |
| **salveger** | 1.fetla 365 rojan 2.di roja qewimî de bibîranîna bûyerê |
| **salyad** | salveger |
| **saman** | 1. milk 2.serwet 3.sermiyan 4.rastmal |
| **sana** | hêsan |
| **sanahî** | hêsanî |
| **sanahî bûn** | hêsan bûn |
| **sanahî kirin** | hêsan kirin |
| **sapok** | pêlavên saqdirêj |
| **saq** | di gore û solan de beşa ku li ser gêzikê dikeve |
| **saqdirêj** | gore û solên ku hetanî bin çongan tên kişandin |
| **sar** | 1. nizmbûna rêjeya germê; serma, seqem 2. sur *“adar e serê sibehan sar e, berê êvarê kûçik xwe didin ber qefa dîwêr e” |
| **sar bûn** | 1. (hewa) rêjeya germê daketin 2. (giyanewer)ji tiştekî vekişîn |
| **sar kirin** | 1. rêjeya germê daxistin2. sil kirin |
| **sarinc** | saring |
| **saring** | 1.bîrên di xilxileyên kiran de 2.cemedank |
| **sarîc** | sarinc |
| **sarûgerm** | 1. hênik 2.tînşikestî, sêncdaketî |
| **satandin/disatîne/bisatîne** | birinc ji qaşilê wî vejartin |
| **satil** | 1. derdana avê ya dev-vekirî; vêdrok 2. kod *“bîr bi satilan tijî nabin” satîre satore |
| **sator** | 1. kêra mezin 2. bivirê goştî |

| | |
|---|---|
| **satore** | 1. selemtî, olintî 2.bêkêr û bêkar |
| **sava** | zarok |
| **savar** | genimê ku gir hatiye hêrandin |
| **savaxane** | dezgehê amojandin û sexbêriya zarokan |
| **savêr** | çal an jî tasika ku av û dewê kûçikan berdidinê |
| **du segên ser savêrekî** | du nebaşên ku di heman kirêtiyê de karbeşiyê dikin |
| **saw [I]** | 1.tirs, xof 2.dehşet 3.qutaf |
| **saw bi ser ketin** | bayê tirsê ketin zikan |
| **saw [II]** | 1. texmîn 2. nîgaş, xeyal |
| **sawîr** | 1.tirs, xof 2.dehşet 3.qutaf |
| **sawêr** | giyanewerê nîgaşî |
| **sawtehrî** | 1.sersar, xemsar 2.bêkesayet |
| **sax** | 1.giyanewer 2.jîndar 3. bitendurist *“çiqas sax bimînî, ewqas ecêban dibînî” |
| **sax bûn** | 1. pak bûn 2. Bi tendurist bûn *“sax dibin şûna xenceran, pak nabe dewsa xeberan” |
| **sax man** | 1.li ser qeyda jiyanê man 2.ber xwe dan *“heta serî sax dimîne, qûn ecêban dibîne” |
| **saxî** | tenduristî |
| **saxiya** | **te** siheta te dixwazim |
| **sax kirin** | jîndar kirin |
| **saxte** | zir, sexte |
| **saye** | 1. xirabiya ji kirêtiya yekî 2. qenciya ji kerema yekî 3.sîber |
| **di sayeya serê wî de** | 1.bi sedema wî (neyînî) 2.ji kerema wî (erênî) |
| **sayî** | rewşa bêewriyê ya esmên |
| **sayîhişk** | hişkesayî |
| **saz [I]** | 1. pergal2. aheng |
| **saz [II]** | karê amade |
| **saz [III]** | jajelan, levenistan |
| **saz [IV]** | cureyekî amûrên mûsîqayî ye |
| **saz bûn** | 1.çêbûn 2.bipergal bûn 3.sererast bûn |

| | |
|---|---|
| **sazdêran** | civata stranbêjan |
| **sazgar** | 1. tiştê xweşik 2.ava ku vexwarina wê xweş e |
| **sazî** | muesese |
| **saziya karnişîniyê** | dezgehê mîrî yê ku kar û barê karnişînan bi rê ve dibe |
| **saziyên mîrî** | saziyên cemawerî, mueseseyên gelemperî |
| **saziyên fermî** | mueseseyên resmî |
| **saz kirin** | 1.çêkirin 2.bipergal kirin 3.sererast kirin |
| **sazûman** | muesese, pergal |
| **se** | kûçik, seg *“here mêvaniya guran, lê bêse meçe” |
| **seb** | bûjeneke tozkî û qayîm a ku bi avê tê rehnkirin û li şûna heriyê di avahiyan de tê bikaranîn |
| **seb kirin** | bi sebê seyandin an jî seb rijandin serê |
| **seba** | 1.ji bo 2.sebaret bo *“ferman sebahêştiran hat, rovî reviyan” |
| **seba kêçekê lihêfek şewitandin** | da ku hêrs lê sar be ziyanên mezin bi malê xwe xistin |
| **seba qurişekî deh teqle avêtin** | ji bo berjewendiyên erzan rûmeta xwe şikandin |
| **sebaret** | seba |
| **sebaz** | cureyekî kûçikan e |
| **sebî** | zarok |
| **sebîl [I]** | avadaniyên gelêrî ên ku hinekan ji bo xêrê çêkirine; xeyrat |
| **sebîl [II]** | darçixare, qelûn |
| **sebr** | 1.tebat 2.dilaramî *“kesê ku jinekê bîne, divê an tûrek zêrê wî an jî barek sebra wî hebe” |
| **sebûn** | cureyekî bayê sehrawî ye; semûn |
| **secîh** | jîr û xwedanferaset |
| **secîhî** | jîrtî û fehmatî |
| **sed** | 1. jimareya 100’î 2.deh heb deh *“ne yek e,ne didu ne, hezarê bi sed hezaran e” |
| **ji sedê sed** | sedased |

| | |
|---|---|
| **sedesed jimartin** | wekî 100-200-300 jimartin |
| **sedased** | bêkêmasî temamê wê/wî |
| **sede** | sedsal, serdem, qirn |
| **sedem** | sebeb |
| **sedrenc** | lîstikeke ku bi 16 keviran (şahek, şalyarek, heşt leşker, du keleh, du hesp û du fîl)û li ser zevîneke çargoşe tê lîstin; kişik |
| **sedsal** | sede, qirn, serdem |
| **sedta** | 1. sedqat2. jimartina sedesedî |
| **sefandin/disefîne/bisefîne** | 1. raparzandin, parzûn kirin 2.dawerivandin |
| **sefêk** | 1. gêjik, xêvik2. dînik |
| **sefêktî** | 1. xêviktî2. Dîniktî |
| **sefêktî kirin** | wekî xêvik û dînikan tev gerîn |
| **sefîn/disefe/bisefe** | 1.raparzîn, parzûn bûn 2.dawerivîn |
| **seg** | sewalê kedîkirî yê ji bo parastina mal û milkî; se, kûçik *“her seg, bi dû merivan de nayê” |
| **seganî** | kûçiktayî *“sale here siltanî, mehê here mêvanî, rojê here li cihê seganî " |
| **segavî** | cureyekî sewalên ku li qeraxên avan dijî |
| **segbaz** | hînkerê segan |
| **seglawî** | hespê ader, kihêl |
| **segman** | nîşangirê ku mêşa xwe baş îsabet dike |
| **segmasî** | masiyê herî mezin ê biguhan |
| **sehek** | di giyaneweran de şiyana naskirina tîn, çêj, bêhn, deng û rengan |
| **seh kirin** | tê gihiştin, serwext bûn |
| **sehm** | tirs û xof, saw *“sehmhebe, erd giran dibe” |
| **sehol** | di bin bandora sermayê de rewşa ava hişkbûyî |
| **sehol bestin** | qeşa girtin |
| **Seholbendan** | Kelûya Karikê (21’ê Berfanbarê 20’ê Rêbendanê) |
| **sehra** | çola fireh û xewle ya ku xweliya wê xîz e |
| **sehrawî** | tiştê têkildarî sehrayê |

| | |
|---|---|
| **sekerat** | rewşa beriya mirinê |
| **ketin ber sekeratê** | nefesên xwe yên dawî dan |
| **sekihandin/disekihîne/bisekihîne** | (diran) xidikandin/çirikandin |
| **sekihîn/disekihe/bisekihe** | (diran) xidikîn/çirikîn |
| **sekinandin/disekinîne/bisekinîne** | 1.rawestandin 2.aşt kirin |
| **sekinîn/disekine/bisekine** | 1.rawestîn 2.aşt bûn *“kevirên mezin, bi yên biçûk disekinin” |
| **sekitandin/disekitîne/bisekitîne** | mirar kirin |
| **sekitîn/disekite/bisekite** | (seg, beraz û hwd) mirar bûn |
| **sekre** | tasa dêw |
| **sekû** | 1. rûniştek 2.dik |
| **sekûyê benderê** | qeraxa avê ya ku keştî dikarin lê biêwirin |
| **sel [I]** | zinar |
| **sel [II]** | selik |
| **selef** | deyn *“ê xwarî telef e, ê dayî selef e” |
| **selemêşk** | selika ku mêşên hingivî tê de hingivên xwe dihêlin |
| **selemtî** | bêkar û xemsar |
| **selexane** | 1. cihê ku ajal lê tên serjêkirin û kelepîçe kirin 2.teral |
| **selêfkv** | qulên ku di bin dîwaran de vedidin da ku ava baranê di hewşê de gol nebe |
| **selik** | 1. amana ku ji cîl, leven û guliyan tê hûnan; zembîl 2.çapûk *“berx, heta hetayî di bin selikê de namîne” |
| **selixandin/diselixîne/biselixîne** | gurandin |

| | |
|---|---|
| **selmandin/diselmîne/biselmîne** | îsbat kirin |
| **sema** | 1. govend, aheng 2.reqs |
| **semajen** | kes a ku pispora hunerên reqsê ye |
| **semanek** | sewaleke bibask û boçdirêj a ku dişibihe mirîşkê û goştê wê giranbiha ye |
| **semax** | qalkirina hesinî bi tîn û şilahiyê |
| **seme** | ebter, xêvik |
| **seme bûn** | gêjovêjo bûn |
| **seme kirin** | serî lê dewixandin |
| **semer** | keriyek pezê ku ji sed hebî pêk tê |
| **semêş** | cureyekî mêşên ku havînan bi kûçikan de dikevin |
| **semt** | îhtiyat |
| **bisemt** | biîhtiyat |
| **bêsemt** | bêîhtiyat |
| **semûn** | sebûn |
| **semyan** | xwedan, sexbêr |
| **senc** | striyên dara sincikê |
| **sendirîk** | darbest |
| **sendox** | standî, kiriyar |
| **seng** | 1.giranî 2.kevir |
| **sengandin/disengîne/bisengîne** | giraniya tiştekî pîvan |
| **senger** | dîwarê parastinê;kozik, qelaçe |
| **sengera cengî** | di şeran de çalên ku ji bo parastinê tên kolan |
| **sengergeh** | cihê ku senger lê hatine kolan |
| **sengîn** | giran |
| **senîmenî** | tiştê seyr û degme *"senîmenî, mastê tirş û dewê genî, tu bi xwe lêbok î, hêjta bi xelqê dikenî" |
| **senît** | bûjeneke zer a ku mêşên hingivî ji nav xeleqên zikên xwe derdixin û pê kewareyên xwe ava dikin |

| | |
|---|---|
| **sepandin/disepîne/bisepîne** | 1.pê dan kirin 2.lê dan tetbîq kirin |
| **sepêşî** | semêş, mêşese |
| **sepîtk** | arîk, asraq |
| **seqa [I]** | 1.çawaniya rêjeya germ û sermayê 2.feza |
| **seqa [II]** | karê xarkirin û tûjkirinê *“seqa, li gorî heqan” |
| **seqa kirin** | 1. xar kirin 2.tûj kirin |
| **seqem** | 1.sermaya dijwar 2.perat |
| **seqet** | kêmlebat |
| **seqet bûn** | kêmlebat bûn |
| **seqetî** | rewşa kêmlebatiyê |
| **seqet kirin** | kêmlebat kirin |
| **ser [I]** | jor, aliyê jorê, fêz *”li ser berekê pan im, ne ji wan im, ne li wan im” |
| **ser û binê bûyerê** | hemû gir û hûrên rûdanekê |
| **bi ser de çûn** | 1. dan pey 2. pê de çûn3. lê hilatin |
| **bi ser de girtin** | êrîş kirin |
| **bi ser de hatin** | rastî hatin |
| **li ser boça xwe şîn bûyîn** | di temenekî bihurî de wekî ciwanan tev gerîn |
| **li ser boçika xwe rûniştin** | di karê kirêt de bi ser neketin û wekî kûçikekî pîr bi ser dêla xwe de ketin |
| **ser [II]** | 1.di lêş de kuloxê ku çav, guh, dev û mêjî tê de bicihkirî ne *”seriyî gote ezmanî, heta tu li min xudan î, xweşî nagêhêje giyanî” 2. Ji stûyî heta lûtkeya bejnê *”serê keçelan, dikevin paxilên gerdenzeran” |
| **ser û pê** | endamên ku jê kelepaçe çedibe; seqetat |
| **ser berdan** | azad kirin |
| **ser [III]** | cihê bilind, lûtke |
| **ser [IV]** | mezin, serwer *“serê ku were birîn, nayê kirîn” |
| **ser [V]** | destpêk |

| | |
|---|---|
| **serê sibehê** | destpêka rojê |
| **sera** | avahiyên bi debdebe yên ku mîr û serok tê de dijîn |
| **serad** | bêjinga ku gir lê dike; karmax |
| **serane** | di rêvebiriya îslamî de diravê ku ji ehlikitabê tê standin; cizye |
| **seranser** | ji vî serî bigire heta serê din |
| **seranserî welêt** | li her dera niştimanê |
| **seraşpêj** | xurekpêjê sereke |
| **serata** | 1. serê pêşîn 2. bermaya diravên gir |
| **seratayî** | pêşîn, yekemîn |
| **serbajar** | payetext |
| **serban** | serê xênî *“serbanqul e, binban şil e” |
| **serbar** | 1. barikekî biçûk ê ku datînin ser pişta heywana barkirî 2.di male da ji hemûyan hêjatir û rêzdartir *“bar merivan nakuje, serbarmerivan dikuje” |
| **serbarî** | 1. giraniya ser giraniyê2. xeyd |
| **serbarî vê yekê** | ji vê hindê wêdetir |
| **serbarî lê kirin** | 1. bûn giraniya ser giraniyê 2.bûn xeyd û ketin stûyê yekî |
| **serbask** | 1. riya ku li ser gir an jî çiyan re derbas dibe2. serê qelûnê |
| **serbaz** | leşkerê payedar |
| **serbazî** | endamtiya payedar a artêşa bipergal |
| **serberedayî** | 1. Bêxwedî 2. sewala bêgem û bêkap |
| **serberz** | birûmet û serbilind |
| **serbest** | 1. rizgarbûyî 2.azad |
| **serbest berdan** | 1. Azad kirin 2.ji qedexeyan rizgar kirin |
| **serbestî** | 1. rizgarî 2.azadî |
| **serbêrî** | berpirsa bêrîvanan |
| **serbijîşk** | 1. tebîbê sere 2.serokê hekîman |
| **serbilind** | birûmet, bişeref |
| **serbilindî** | serfirazî |
| **serbir** | 1. stûbir, celad 2.mêrkuj |

| | |
|---|---|
| **ser birîn** | ser jê kirin |
| **serbixwe** | xwemuxtar, xwebijartî |
| **serborî** | serpêhatî |
| **sercem** | 1.gujim, hemû, giştê 2.yekpare 3.tev |
| **ser çemandin** | ser tewandin |
| **serçemk** | serê rêza govendê |
| **serçemk girtin** | sergovendî kirin |
| **serçimk** | serê tiliyên piyan |
| **bi serçimkan bi rê ve çûn** | nermînka û bi sere tiliyan meşîn |
| **serçok/serço ng** | movika ku hestiyê hêt û çîpê digihêjîne hev |
| **serdab** | neqeb, qul, kun |
| **serdan** | ziyaret |
| **serdanpê** | ji sêrî heta piyan; seranser |
| **serdar** | serok |
| **serdarî** | seroktî |
| **serde** | pêlekan |
| **serdem** | heyam, çax |
| **serdema kevirîn** | di şaristaniyekê de heyamên ku alav û amanên kevirîn dihatin bikaranîn |
| **serdema raperînê** | di şaristaniyekê de heyamên ku şoreşên dijî zordestiyê mohra xwe lê xistine |
| **serdema ronahiyê** | di şaristaniyekê de heya-mên destpêka rewşen-bîriyê |
| **serdemên zêrîn** | di şaristaniyekê de heyamên ku pêşketin tê de gihiştiye asta hera bilind |
| **serdest** | 1.desthilat 2.bibandor *"bindest û serdest,nabin yek dest" |
| **serdest bûn** | desthilat bûn |
| **serdeste** | di artêşê de fermandarê desteyeke ji 12 kesan pêkhatî |
| **serdestî** | desthilatî |
| **serdilk** | delaliyê malê; ezîz |
| **serdozger** | serekê qaziyan |

| | |
|---|---|
| **sere** | 1. xeraca bi gef û gurê; fidye 2. navsale |
| **serederî** | pêkanîn û qedandin |
| **serederî pê re derxistin** | 1. pêk anîn û qedandin 2.pê bûn |
| **serek** | 1.serwer, serok 2. rêber |
| **sereke** | tiştê ku girîngiya wî di asta yekemîn de ye |
| **serenav** | navê taybet ê ku tenê ji bo kesekî an jî tiştekî tê hildan |
| **serencam** | 1. dawî 2. aqibet 3. kutahî |
| **serencama berhevxistinê** | yekûna hejmarên ku hatine derbdanê |
| **serencama dabeşkirinê** | yekûna hejmarên ku li hev hatine parvekirin |
| **serencama derxistinê** | yekûna hejmarên ku ji hev hatine derxistin |
| **-serencama komasiyê** | yekûna hesabekî |
| **sererast** | 1. bipergal 2. wekî ku pêwist e |
| **sererast bûn** | 1.rast gerîn2.çêbûn 3.durist bûn |
| **sererast kirin** | 1.tehqîq kirin 2.durist kirin 3. rast gerandin |
| **serêş** | êş û jana ku di serî de pêk tê |
| **serêşî** | 1. nexweşiya êşa seriyan 2. arîşe |
| **serfermandar** | di artêşê de fermandarê herî payedar |
| **serfiraz** | 1.rizgar 2.serberz, serbilind |
| **serfirazî** | 1.rizgarî 2.serbilindî 3.serkeftin |
| **sergamêş** | dijûna ji bo kesê sermezin |
| **serger** | rastahiya li serê bilindahiyekê *“mêrê çê serger e, mêrê nebaş binger e” |
| **sergerdan** | 1. serek, serpêşsen2. betevala, bêhemal 3.şepirze |
| **sergerdan kirin** | bêsexbêr kirin, beredayî berdan |
| **sergerm** | 1. bicoş 2.rûgeş |
| **sergermî** | 1. coşî2. rûgeşî |
| **sergevez** | kesê ku baweriya xwe bi xwe tîne û ji ber kiryarên xwe şanaz e |

| | |
|---|---|
| **sergêj** | 1.sersar, xêvik 2. sefêk |
| **sergihayî** | 1. bidawîbûyî2. (ji aliyê hişmendiyê ve)stewî |
| **sergihayî bûn** | 1. bi dawî bûn2. fêm kirin |
| **sergihayî kirin** | 1. bi dawî kirin2. dan fêmkirin |
| **sergîfk** | sergo |
| **sergîn** | 1.kerme 2.peyn*“dilê þivên kete kete sergînekî, heft salan ew di tûrikê xwe de gerand” |
| **sergo** | cihê ku zibilê davêjinê; kaj *“gund, ne bê sergoye” |
| **sergotar** | navnîşanên pêşîn ên destpêka gotarekê |
| **sergovend** | govendkêşê ku dîlanê digerîne *“di govenda cahilan de, sergovend xuya nabin“ |
| **serhed** | tixûb |
| **serhejhejok** | 1. kesê ku serê li wî aliyî û li vî aliyî dileqe 2.kesê temenbihurî *”zivistanê, serhejhejokçêtir e ji dûvhejhejokî” |
| **serheng** | di artêşê de payeya fermandarê hengeke leşkerî |
| **serhevde** | 1.teral 2.eyba kesekî ya ku hinek dikarin bidin rûyê merivekî wî; pozdaxî |
| **serhevraz** | ber bi jor *“a- va xurtan, serhevraze” |
| **serhewa** | meqameke kilaman a dirêj û bi şewat e, dûrik |
| **serhildan** | îsyan |
| **serhildêr** | kesê ku li ber pergalekî radibe; îsyankar |
| **serhişk** | 1.înkdar, engirî2.serkevir |
| **serhişkî** | heter |
| **seridîn/diseri de/biseride** | behîn, stewîn, zer bûn, gihiþtin |
| **serik** | 1. serê biçûk 2. serê çêreyên wekî pîvaz, sîr û sêva binerdî 3.dervank |
| **serinc** | 1. bal 2.taybetmendî |
| **-serinc rakêşan** | bal kişandin |
| **serincrakêş** | balkêş |
| **serişte** | 1. berate 2. elamet |
| **serî** | 1. nik, nikil 2.qaf*“jin dimire, serî li mêr digere” |
| **-serî lê dan** | daxwaz kirin, muracaet kirin |

| | |
|---|---|
| **-serî lê gerandin** | 1. gêjomêjo kirin 2.bilandin |
| **ser jê kirin** | 1.serî qut kirin 2.kuştin |
| **serjimar** | gelhe, nifûs |
| **serjimara giştî** | gelheya seranserî welatekî |
| **serjinik** | kesê ku bi karên jinan radibe an jî xebera jinan dike; serpîrek |
| **serkan** | di artêşê de serbazê ku perwerdehiya leşkerî ya bilind kuta kiriye |
| **serkanî** | navenda ku av jê dizê, çavkanî |
| **serkantî** | di artêşê de desteya serbazên payebilind |
| **-serkantiya giştî** | saziya ku serfermandariya artêşê digerîne |
| **serkar** | rêvebirê dezgeh, kargeh, sazî hwd |
| **serkarî** | 1. desteya rêvebiran 2. avahiya rêvebiriyê |
| **serkeftin** | 1.jêhati 2.jîrî3.zîrekî |
| **serkeftî** | 1.jêhatî 2.jîr 3. zîrek |
| **serkêş** | rêber, pêşeng |
| **serkêşî** | rêberî, pêşengî |
| **serkêşî** | 1. pêşî kişandin2. rêberî kirin 3.serwerî kirin |
| **serkol** | serqot |
| **serkolî** | serqotî |
| **serkut** | tiştê ko û netûj |
| **serkut bûn** | 1. winda û nepen bûn 2. tepeser bûn, çewsîn |
| **serkut kirin** | 1. tepeser kirin, çewsandin2. veşartin |
| **serleşker** | fermandarê desteyeke leşkerî |
| **serliq** | di artêşê de payeya fermandarê liqeke leşkerî |
| **serma** | hewaya sar; seqem*“sar û serma ye, potik bav û bira ye” |
| **-serma girtin/xwarin** | zekemî bûn, bi çilmasiyê ketin |
| **sermal** | pêçeya ku li sêrî tê pêçan di destê mirovî de heye |
| **sermaye** | mal û milkê ku |
| **sermayedar** | xwedî-rastmal |
| **sermayedarî** | pergala ku xwedan-rastmal tê de desthilat in |

| | |
|---|---|
| **sermedî** | 1.ebedî 2.hetahetayê |
| **sermest** | 1.serxweş 2.eyaş, meyxur 3.gêj |
| **sermest bûn** | 1. serxweş bûn 2. hay ji xwe neman3.gêjovêjo bûn |
| **sermestî** | 1. serxweşî 2. meyxurî 3. gêjtî |
| **sermeşq** | nimûne, mînak |
| **sermil** | 1. serkulang 2. di kincan de beşa ku dikeve ser milan û di hinan de hinekî stûr e |
| **sermiyan** | 1. dewlemendî2.rastmal *“aqil pir sermiyane, ne karê merivan gişkan e” |
| **sermiyandar** | dewlemendê xwedî-rastmal |
| **sername** | sernav |
| **sernav** | peyv an jî hevokên ku mijara nivîsekê dinimînin |
| **sernerm** | 1. awirşikestî 2. bêhnfireh |
| **sernewq** | 1.rezîl 2.rûreş |
| **sernişîv** | serberjêr |
| **sernivîsar** | nîvîsara sereke ya ku sernivîskar dinvîse |
| **sernivîskar** | serokê nivîskarên kovar û rojnameyan |
| **sernixûn** | sernişîv |
| **sernûçe** | xebera sereke |
| **sernûser** | sernivîskar |
| **serobino** | 1. tevlihevî  2. aloz |
| **serok** | kesê ku bi rêvebiriya deste, dezgeh, partî, welat û hwd radibe; rêber, serkêş |
| **serokatî** | 1.serwerî, desthilatî 2.rêberî |
| **serokomar** | reîsê cumhûriyetê |
| **serokwezîr** | reîsê wezaretan |
| **serpel** | di artêşê de payeya fermandarê peleke leşkerî |
| **serpene** | keteber, bêpergal |
| **serpene kirin** | 1. keteber û bê pergal tevgerîn 2. (kar) birêkûpêkî nekirin |
| **serperişt** | peywirdarê ku rêvebiran teftîş dike; mifetiş |
| **serperî** | 1. seroka cinan2.periya zeryayî |
| **serpêhatî** | macera, serborî |
| **serpiyan** | kar û barên ku bêyî dezgehekî rûniştî tê pêkanîn |

| | |
|---|---|
| **-bazirganiya li ser piyan** | danûstandinên ku derveyî firoşgehan û li serê kolanan tê pêkanîn |
| **-xwarinên serpiyan** | xwarinên ku zû dipijin |
| **serpî/serpîl** | sermil, kulang |
| **serpîrek** | serjinik |
| **serpopil** | serê her tiştê ku wekî derzîreqê ye |
| **serpûş** | hemû cureyên kum an jî mêzerên seriyan |
| **serqot** | kesê ku tiştek nedaye serê xwe;servekirî |
| **sersabûn kirin** | xapandin |
| **sersal** | 1.vegera serê salê, yekê meha yekemîn a salnameyê 2.nûroj |
| **sersar** | kêmbihîstyar |
| **sersarî** | kêmbihîstyarî |
| **sersarî kirin** | li şîretan guhdarî nekirin |
| **sersax** | kesê bê arîşe û kêmasî |
| **sersaxî** | ji xizmên miriyan re hedar û ji miriyan re jî rehmet xwestin; serxweşî |
| **sersaxî jê re xwastin** | ji malbata miriyan re gotin: "serê we sax be" |
| **serşok** | cihê ku lê serî tê şûştin |
| **sertar** | gupika çiyê; qot |
| **sertaser** | seranser |
| **sertilî** | serê tiliyan |
| **sertiraş** | kesê ku pîşeyê wî kurtisandina poran e |
| **sertiraşî** | karê kurtisandina poran |
| **sertiraşxane** | cihê ku mirov lê porê xwe dide kurtisandin |
| **sertîr** | serê guhên |
| **sertît** | di artêşê de fermandarê ku payeya wî di navbera serhengî û serlîwatiyê de ye |
| **serwer** | 1.desthilat 2.serok 3.rêvebir |
| **serwerî** | 1.desthilatî 2.serokatiya wezaretan 3. rêvebiriya karekî *"bê serwerî, girara piran nakele" |
| **serwext** | 1. zana 2.hişyar3.hişmend |
| **serwext bûn** | 1.sergihayî bûn 2.hişyar bûn |

| | |
|---|---|
| **serwext kirin** | 1.sergihayî kirin, îqna kirin 2.hişyar kirin |
| **serxur** | bêyom, bêpêpal |
| **serxwe** | xweş û gihan, jîr û li ser piyan |
| **serxwebûn [I]** | 1.xoybûn, xwebixwetî 2. felat 3. rizgarî |
| **ser xwe bûn [II]** | xweş û gihan bûn, jîr û li ser piyan bûn |
| **serxweş** | 1. sermest 2.eyaş 3.meyxur 4.eraqxur *"axa xurt be, xulam serxweş digerin" |
| **sersil** | rêzehestiyên piştê yên ku ser û lingan bi hev ve girêdidin |
| **serxweş bûn** | 1. sermest bûn *"beq, bi avê serxweş dibe" |
| **serxweşî [I]** | sermestî |
| **serxweşî [II]** | sersaxî |
| **serzelût** | qafkeçel |
| **setimîn/disetime/bisetime** | pê li tiştekî alîn û lli erdê ketin; tehisîn |
| **sevî** | selikeke mezin û kûr a ku mêweyan dikinê û didine ser pişta sewalan |
| **sewa** | seba |
| **sewal** | heywan, ajal |
| **sewda** | evîn |
| **sewdal** | aqil, hiş |
| **sewdaser** | evîndar |
| **sewgirandin/disewgirîne/bisewgirîne** | 1.mîsoger kirin 2.bîme kirin |
| **sewl [I]** | kulîlkek e |
| **sewl [II]** | bêrika kelekvanan |
| **-sewl dan** | (bi bêrikên kelekvaniyê) hewl dan |
| **sews** | sehm |
| **sewt** | deng |
| **-sewtek li erdê yek li esmên bûn** | ji ber êş û tajanan qareqar kirin |
| **-ji sewt ketin** | 1. lap westîn 2. ji ber qîrînê êdî deng jê derneketin |

| | |
|---|---|
| **sewtsewtok** | çelçelok |
| **sewz** | kesk |
| **sewzî** | 1. keskahî2. (çi pijandî çi nepijî) hemû berên bîstanan, çêre û pimparên ku tên xwarin sexbêrxwedî *"her canek, di dilê sexbêrê xwe de siltanek e" |
| **sexbêrî** | 1.xwedîtî 2.xwemalî, hemalî |
| **sexbêrî kirin** | 1.xwedîtî lê kirin 2.bêhemal nehiştin |
| **sexbêrvan** | kesê ku çavdêriya zarok, mal an jî sewalan dike |
| **sext** | 1.dijwar, tund 2.şidiyayî, muhkem |
| **sexte** | karê nerewa û tiştê nedurist; beqem, qulebî |
| **sextiyan** | çermê stûr |
| **sexele** | berx û karên viringî |
| **sewad** | hunera xwendin û nivîsandinê |
| **-xwedî-sewad bûn** | bi hunera xwendin û nivîsandinê beled bûn |
| **sewal** | heywan, ajal |
| **sewalvan** | ajalvan |
| **sewalvanî** | ajalvanî |
| **sewt** | deng, awaz |
| **sewnês** | çilmasa kûçikan |
| **sewnêsî** | kûçikê bahorî |
| **seya** | rûkişandina dîwaran |
| **seyandin/diseyîne/biseyîne** | rûyê dîwer bi herî an ji kilsê û hwd betankirin |
| **seyd** | nêçîr *"ling li qeydê, çav li seydê" |
| **seyda** | 1.zana 2.alim 3. mela |
| **seydvan** | nêçîrvan |
| **seylav** | 1.lehiyên ava gur2.ava gumrah a piştî baraneke boş |
| **seylax** | di qeraxên avan de erdê bi xîz |
| **seynik** | di saet û qiblenameyan de çembera ku hejmar û nîşanên dem û aliyan nîşan dide |
| **seyr** | ecêb, xerîb |
| **seyran** | geşt û ger |

| | |
|---|---|
| **seyrangeh** | cihê ku ji bo geşt û gerê munasib e |
| **seyranî** | kesên ku diçine geşt û gerê; geþtiyar |
| **seyrek/seyrnîşan** | pirsnîşan, /?/ |
| **seza [I]** | 1. şerm, eyb2. nebaşî |
| **seza [II]** | layîq |
| **-sezayî pesndanê** | layîqî padanê |
| **seza [III]** | tola qanûnî ya li hemberî her gunehek an karekî nerewa û nedurist; ceza |
| **-sezaya laşî** | cezayê bedenî |
| **seza kirin** | ceza kirin |
| **sê** | 1.hejmara beriya çaran û piştî diduyan 2.jimareya 3'yan *"sê teres hene li gund: kalê jinrind, feqîrê bêvilbilind, mêvanê mal di gund" |
| **-sê kevirê wê dan ber sêrî** | jin bêveger berdan |
| **sêbare** | sê caran |
| **sêbare bûn** | sê caran rûdan |
| **sêbare kirin** | sê caran gotin an jî kirin |
| **sêdar** | 1. sê darên ku serên wan bi hev ve girêdidin û meşkê tê de dikên2.sê darên ku serên wan bi hev ve girêdidin û tawanbaran tê de bi dar ve dikin |
| **sêdîmenî** | tiştê ku berahî, dirêjahî û kûrahiya wî heye |
| **sêgoşe** | şeklê ku li ser sê çiman ava bûye |
| **sêguh** | sêtilî, şene |
| **sêk** | ava tirş |
| **sêl** | alava hesinî û gilover a ku nan li serê tê pehtin*"hem nanê ser sêlê ye, hem jî teniya binê beroşê" |
| **sêlik** | 1. sêla biçûk2. bûjeneke lek a gilover e; deng, reng û bername li ser tên tomarkirin |
| **sêlav** | seylav *"sêlavher tim bi xwe re qurman nayne" |
| **sênc** | 1.tîn 2.heraret 3. şkênc û jan |
| **sênex** | bendê ku ji sê bendên zirav hatiye ristin |
| **sênî** | berkeş |
| **sêpî** | sêdar |
| **sêr kirin** | 1.temaşe kirin2.mêze kirin |

| | |
|---|---|
| **sêsibeh** | piştî sê rojan |
| **Sêşem** | roja çaremîn a hefteyî |
| **sêta** | 1. ji sê bendan pêkhatî 2. ji sê taqan pêkhatî |
| **sêtîr** | cureyekî tifingên kevn e |
| **sêv** | cureyekî mêweyan e*“heta kusêv bi darê ve be, dê her kes keviran bavêjê” |
| **sêvaxîn** | cureyekî sewziyên ku wekî kartolan di bin erdê de hêşîn dibe |
| **sêvik** | movika ku hestiyê lingan bi sersilê ve girêdide |
| **sêwak** | 1.sersar 2.betal3.revo |
| **sêwirandin/disêwirîne/bisêwirîne** | 1.xeyal kirin 2.şayese kirin 3.aşt kirin |
| **sêwirîn/disêwire/bisêre** | 1.şayese bûn 2.aşt bûn 3.qiriyan |
| **sêwî** | bêdê, dêmirî *“berxê sêwî, beran jê dernayê” |
| **-sêwiyê binçengşewitî** | xizan û jarê eks û nehs |
| **-sêwî man** | bêdê man, dê lê mirin |
| **sêwîxane** | saziya ku sexbêriya zarokên dêmirî û bêxwedî dike |
| **sêyek** | ji sê paran parek, 1/3 |
| **sêzdeh** | 1.hejmara beriya çardehan û piştî duwazdehan 2.jimareya 13’an |
| **sêzdehem(-în)** | di rêza sêzdehan de |
| **Sibat** | meha reşemiyê *“sibat tiro-viro, adar ma bîst û du ro” |
| **sibe** | sibeh *“sibe tê, xêrjî pê re” |
| **sibeh** | 1.destpêka rojê 2. dîtira rojê *“keça bê bav û dê, êvarê diçe û sibehêtê” |
| **-sibeh lê pag bûn** | gihiştin sibehê |
| **sibetir** | dusibe |
| **sicade** | tiştê paqij ê ku nimêj li serê durist e |
| **-sicadeya xwe li dojehê raxistin** | îmana xwe avêtin |
| **sicûr** | şewateya ku pê êgir dadidin; ardef *“beriya sicûrê xwe davê tenûrê” |

| | |
|---|---|
| **sifir [I]** | kanzayê mîsê |
| **sifir [II]** | 1. net, netêw, nîn, (0) 2. hîç, ne tu tişt |
| **sifirne** | sîvander |
| **sifre** | mase, pîne û tiştên din ên ku ji bo xwarinê tên raxistin *“dil ne sifre ye ku li ber her kesî vekî” |
| **-sifre danîn** | xwarin danîn |
| **sift** | tiştê tîr û hasilbuyî an jî vepesirî |
| **siftî** | rewşa tîrbûn, hasilbûn û vepesirîna bûjenan |
| **sih [I]** | cihê ku tav jê nagire *“ma kes nikare bibêje ku siha te xwar e?” |
| **sih [II]** | 1. sê heb deh 2. jimareya 30’î |
| **sihik** | ava tiriyan a hilatî û bi emadê xwe tirşbûyî; sirke |
| **sihin** | rewşa şaşopaşobûnê; heys û beys |
| **sihirandin/di sihirîne/ bisihirîne** | 1. gayîn 2. hiltirandin, tecawuz kirin |
| **sihirîn/disihir e/bisihire** | 1. hatin gayîn 2. tûşî tecawuzkirinê hatin |
| **sik** | kirêt û menfûr |
| **sikil** | xweliya argonî ya ku tê de parçeyên êgir mane |
| **sikir** | benda avê *“av, ji serê sikirê de ziwa dibe” |
| **sikûm** | rû, çehre, sîma |
| **sikûmreş** | bêyom, bêpêpal |
| **sil [I]** | çilek |
| **sil [II]** | gemara dewêr a ron |
| **-sil kirin** | (dewar) rîtin |
| **sil [III]** | 1. zûxeydok2. kesê ku ji tiştinan aciz dibe |
| **-sil bûn** | 1. zû bi zû xeyidîn 2. ji tiştinan aciz bûn |
| **-sil kirin** | 1. rarûyî yekî ketin 2. tiştê ku jê aciz dibe lê nîşan dan *“jinê dil kir, mêrê xwe sil kir” |
| **silal** | serban |
| **silamet** | 1. bêzede2. bêbela |
| **silav** | selam, pate *“silav li miyan e, ne li rûyan e” |
| **-silav dayîn** | selam dayîn, pate lê dayîn |

| | |
|---|---|
| **-silav kirin** | selam kirin, pate lê dayîn |
| **-silav lê kirin** | selam jê re şandin |
| **silavî** | îhtiram û xweşhatinî |
| **-çûn silaviyê** | çûn serdana yekî û giramî jê re girtin |
| **sildank** | berkurk |
| **silek** | çilek |
| **silekî** | çilekî |
| **silekî kirin** | çilekî kirin |
| **silepor** | komek gemara dewêr a rehn |
| **silikandin/disilikîne/bisilikîne** | 1. rarûyî yekî ketin 2. tiştê ku jê aciz dibe lê nîşan dan û ew dan revandin 3.heywan tirsandin û dan revandin |
| **silikîn/disilike/bisilike** | 1. bertek nîşan dan 2. zû xeyidîn 3.(sewal) tirsîn û revîn |
| **silim** | pêlekan, pêpelûk |
| **silîng** | amûra ku barên giran ji cihekî neqlî cihekî din dike |
| **silq** | cureyekî sewziyên ku jê şekir tê bidestxistin û pijandî jî tê xwarin |
| **silqî** | saye |
| **-silqiyî serê te** | (neyînî û erênî) bi sayeya te de |
| **silsilok** | kesê ku zû bi zû dixeyide û tengezar dibe |
| **siltan** | 1.desthilat, hukimdar 2.serwext û jêhatî*“siltik hatin bûn û siltan, pêlik danîn û çûn esmanan” |
| **silûk** | 1.înziwa 2.( ji bo ku rewanpakiyê pêk bî-nin) tenêtiya sofiyan |
| **-ketin silûkê** | 1. derketin înziwayê 2.(ji bo paqijiya derûnî)xwe tenê hiştin |
| **sim** | piyên ajalan *“çavê nalbendan li simên hespan e” |
| **simandin/disimîne/bisimîne** | qul kirin, simitandin |
| **simarte** | bûjeneke girtikgirtî ya ku pê girnoz tên jêbirin |
| **simbêl** | pirça ku li ser lêvan û bin bêfila mêran û hin sewalên nêr hêşîn dibe *“dilî bide ber dilan, gulê bide ber simbêlan” |
| **-simbêl tê de badan** | di xwarina xweşde kêf kirin |

| | |
|---|---|
| **simbêlboq** | simbêlpoşe |
| **simbêlçixt** | kesê ku simbêlên wî badayî û sertûj in |
| **simbêlpoşe** | kesê ku pirça simbêlên wî boş û dirêj e |
| **simbil** | di zêd de seriyê ku dan tê de ne |
| **sime** | çatkêş |
| **simil** | simbil |
| **simitandin/disimitîne/ bisimitîne** | qul kirin, simandin |
| **simitîn/disimite/bisimite** | qul bûn, simîn |
| **simîn/disime /bisime** | qul bûn, simitîn |
| **simkot** | tasika vexwarinê ya biçembil; şerbik |
| **simok** | alava qulkirinê; miqar, metqeb |
| **simtiraş** | nalbend |
| **simolek** | sewaleke boçdirêj û biçûk a ku bi lez hildikişe daran û ji bindeqan pir hez dike |
| **simsik** | çilek, silek |
| **simt** | lûtke, zîrwe |
| **simûçk** | serê tiliyên piyan |
| **-bi serê simûçkan meşîn** | 1. pir bi baldarî meşîn 2.li ser hêkan meşîn |
| **sinaet** | pîşe *“sinaet çek e, di berîka xwe ke, te hewce dît dêrî veke” |
| **sinarîn/disinêre/bisinêre** | rexne kirin |
| **sinc [I]** | 1.exlaq, xislet 2. taybetmendî |
| **sinc [II]** | 1. germahî, tîn2. jana birînê 3. herareta bûyerê |
| **sincan** | xwedanrewişt |
| **sincaq** | 1. derziyeke badayî ya ku pê devê berîkan û bestina du pîneyan tê bikaranîn; şewk2. hilçoyê çeqelkî 3. şewka masîgiran |
| **sincirandin/disincirîne/bisincirîne** | 1. agir geş kirin, sor kirin 2. coşî û peroşiya bûyerê zêde kirin |

| | |
|---|---|
| **sincirîn/disincire/bisincire** | 1. agir geş bûn, sor bûn 2. coşî û peroşiya bûyerê zêde bûn |
| **sincîd** | 1. cureyekî daran e2.berên dara sincîdê |
| **sindan** | amûreke hesinî ya ku tiştên hesinî li serê tên kutan |
| **sindif** | pozmika devê heywanan |
| **sindirîk** | sindoqeke taybet a ku miriyan dikinê |
| **sindî** | cureyekî mêweyên ku dişibihine porteqalan û çêja wan tehlovanckî ye |
| **sindoq** | qutiya ku kel û mel tê de tên parastin |
| **sinet** | 1. kirinên Cn. Pêxember 'eleyhiselam 2. (li cem cihû û misilmanan)qutkirina çêrmikê li ser endamê zayendî yê mêran *"şêwr, sinet e" |
| **sinet kirin** | (li cem cihû û misilmanan)çêrmikê li ser endamê zayendî yê mêran qut kirin *"gava dîn sinet bikin, ji binçirkê ve qut dikin" |
| **sinêde** | 1. bi ser re 2. karê sixtopixto 3.tenîsk |
| **-gule bi sinêde lê ketin** | gule spîldaxkî bi ser re derbas bûn |
| **sinêle** | 1. temenê di navbera zaroktî û mezinbûnê de 2. nîvmêr, jinkok |
| **sing** | 1.çoyê stûr û dirêj2. endamê zayendî yê nêrzayan *"derziya di çavê xelqê de dibînê, lê singê di çavê xwe de nabîne" |
| **-sing di ber de kutan** | 1. zina kirin 2.tecawuz kirin 3.gayîn *"tar tara wê bû, heta ku bêbavekî singekdi ber de kuta" |
| **singîr** | qamûş an jî darikekî zirav ê ku pê qirtik û pûrtên zêde ji rîsê nûristî tê veqetandin |
| **singîr kirin** | rîsê nûristî ji qirtik û pûrtên zêde paqij kirin |
| **singo** | di cenga rû bi rû de kêra ku bi ser lûleya tifingê ve dikin |
| **sinik** | cureyekî bihukên ku ziyanê dide zadî |
| **sinix** | riswa |
| **sinix bûn** | riswa bûn |
| **siparte/sipartek** | 1.peywira taybet 2. emanet |
| **sipartin/dispêre/bispêre** | 1. emanet kirin2. teslîm kirin |
| **sipsax** | li ser xwe û ne mirî |
| **siqa** | hesan |

| | |
|---|---|
| **siqa kirin** | bi hesanê tûj kirin |
| **sir** | raz, bîs *”dixwazî sira xwe ji dujminê xwe veşêrî, ji dostên xwe re nebêje” |
| **sirêş** | bûjena ku tiştan bi hev ve dizeliqîne |
| **sirişk** | rondik |
| **sirke [I]** | sing û hesinê ku kapên sewalan davêjinê |
| **sirke [II]** | ava tiriyên guvaştî |
| **-sirke kirin** | ava tiriyên guvaşti bi ser de rijandin |
| **sirnî** | parçeyê ku davêjin navbera du tayeyan |
| **sirsûm** | alaveke darînî an jî ji hesinekî tenik e û li şûna kilmeşkê bi kar tînin |
| **siruşt** | 1.xweza 2.fitret |
| **siruştî** | 1.xwezayî 2.fitrî |
| **sirûd** | neşîd, marş |
| **-sirûda neteweyî** | neşîda/marşa dewletekî |
| **-sirûdên leşkerî** | marşên ku lehengiyên artêşê dinimînin |
| **sisê** | sê *“gava serî bûn sisê, wan bavêje ber sê; ji ber ku sisê, li hev asê ye” |
| **sisî** | tovê kengîran |
| **sist** | 1. neşidiyayî 2.nerm |
| **sist bûn** | 1. tiştê şidiyayî vebûn2. nerm bûn |
| **sistî** | nermî |
| **sist kirin** | 1.nerm kirin 2. tiştê şidiyayî vekirin |
| **sitam** | 1. berevan 2. parêzvan |
| **sitamî** | 1.himaye 2.berevanî |
| **-sitamî lê kirin** | 1.himaye kirin 2.parastin |
| **sitar** | hêza serxwemanê; qudûm |
| **-sitar tê de neman** | 1. pir kevn bûn 2. pir lawaz bûn |
| **sitare/sitargeh** | êwirgeh |
| **sitem** | 1. zulm 2.pêkutî3.zext |
| **sitembar** | 1.zalim 2.zordest |

| | |
|---|---|
| **sitembarî** | zalimtî, zordestî |
| **sitemkar** | sitembar |
| **sitêl** | qiraca çik |
| **sitirandin/disitirîne/bisitirîne** | 1.parastin 2. êwirandin 3.hewandin4.aşt kirin 5.bilandin |
| **sitirîn/disitire/bisitire** | 1.êwirîn 2.aşt bûn 3. bilîn *“kes-nekirî û jina kes-nebirî, bi hev sitirîn” |
| **sitî** | stî |
| **sitvan** | serpel |
| **siûd** | bext, talih *“bila siûda mirovî lêhatî be, aliyekî mirovî jî tunebe” |
| **sivder** | 1. hêwana malê 2. derazînka (pêderiyê) derê malê |
| **sivik** | negiran *“aqilê sivik, barê giran e” |
| **sivikahî** | negiranî |
| **sivik bûn** | giran nebûn |
| **sivik kirin** | giranî jê daxistin |
| **siving** | qeşayên ku ji banan dadiliqin; lîla banan |
| **sivnik** | 1.gêzî 2.siqayîl |
| **sivorî** | simolek |
| **sixêf** | dijûn, çêr *“sixêf, karê jinan e” |
| **sixêf kirin** | dijûn kirin, çêr kirin |
| **sixtopixto** | serpene |
| **sixtopixto kirin** | serpene kirin, serpeçûm kirin |
| **siwar** | kesê ku hilkişiyaye ser sewal an jî navgîneke raguheztinê *“çi bibêjî jî, li bejna siwarê min tê” |
| **siwar bûn** | 1.hilkişîn ser2.bazdan ser *“helkhelka gavanan, ji siwarbûna keran e” |
| **siwar kirin** | 1. bar kirin2. avêtin ser piştê |
| **siwar peya kirin** | pergala karê xelqê betal kirin |
| **siwat** | riba, faîz |
| **siwax** | seya |
| **siyaset** | zanistên rêvebiriyê; ramyarî |

| | |
|---|---|
| **siyasetmedar** | pisporê rêvebiriyê; ramyar |
| **siyasî** | ramyarî |
| **siyele** | çêreyeke ku belçikên wê weke sewziyan tên bikaranîn û pijandî tê xwarin |
| **sî** | sih *“adarê, agir xweştir e ji siya darê” |
| **sîber** | zag |
| **sîdar** | xwedî-sih |
| **sîgeh** | sîwan |
| **sîhir** | cadû |
| **sîhirbaz** | cadûbaz |
| **sîkard** | bivirê goştî; sator |
| **sîkene** | di hundirê makîneyê de pergala ku xebata wê têkûz dike |
| **sîl** | nexweşiya xefirxanê |
| **sîle [I]** | lêxistina bi kefa destî, şeqam |
| **-kod bi dêv re sîle kirin** | kod mişt tijî kirin û zêdehî bi kefa destî rijandin |
| **sîle [II]** | kevirê ku goşeyên dîwaran digihîne hev |
| **sîm** | zîv |
| **sîma** | ser û çav; rû |
| **sîme** | perjanê hesinî yê dir û bikelem ê ku (ji bo parastinê) dora zevî û erdan pê tê rapêçan |
| **sîme kirin** | dor bi sîmeyê rapêçan |
| **sîmerx** | di çîrokan de balindeyê efsûnî yê ku mirov lê siwar dibûn û bi kêrî raguhastinê dihat |
| **sîmsar** | bazirganê ku ji firoşkar û kiriyar re navberkariyê dike û para xwe ji her dû seriyan jî distîne |
| **sînahî** | bînahiya tiştan a ne li gorî rastiya wan lêbelê wekî sîber û pêjnan |
| **sîndir** | cûnî |
| **sîng** | 1.gerden 2.qefes 3. ber *“çavê tirsonek sîngê spî nabîne” |
| **sînor/sindor** | tixûb, hudûd *“sînorê xurtan tune ye” |
| **sînorbir** | derveyî tixûbên heyî |
| **-rojnamevanên sînorbir** | endamên çapemeniyê yên ku tixûbên rûmetşikên napejirînin |

| | |
|---|---|
| **sîpel** | 1. şelale, şîp 2. pifdankeke di nav zikê masiyan de ye |
| **sîqal [I]** | 1.cîle, mesqel 2. bêkêrtik, meht 3.rewneqdar |
| **sîqal [II]** | lûlikên qeşayê yên ku di zivistanan de bi kevir û banan ve dadiliqin; siving |
| **sîr** | hêşinahiyeke ku pijandî û nepijandî tê xwarin û bêhna wê mirovî aciz dike *“ne pîvaz e, ne sîr e, tê digere weke qîr e ?” |
| **-sîrek li heft civatan gerandin** | li pir cihan behsa heman tiştê bêbine kirin |
| **sîrfisk** | cureyekî sîrên kûvî yên bêhnkirêt e |
| **sîrik** | sîrim |
| **sîrim** | sîra biyanî |
| **sîrkut** | cûnî an jî derdana ku tê de sîr tê kutan*“sîrkut hilat, mîrkut dahat” |
| **sîs** | 1. tiştê ku tavê lê nedaye û rengê wê spîtale ye2. rengê spî |
| **sîsark** | cureyekî balindeyên ku ser û stûyê wan rût in û goştê miraran dixwin; teyrê berateyan |
| **sîs bûn** | di cihê tarî de man û reng lê spîtale bûn |
| **sîsele** | 1. lawaz 2. yax |
| **sîsirk** | bihukeke biyanî ya ku bi şevê dengekî çirçirok derdixe |
| **sîtar** | tixûb *“her kes di sîtara xwe de şêr e” |
| **sîte** | tora masîgirtinê |
| **sîtil** | amanake mîsîn û mezin a ku tê de xurek tê pijandin |
| **sîvan** | amûreke guhêzbar a ku mirovî ji baran û tavê diparêze |
| **sîvander** | qeşaya ku di banan de dadiliqe; lîl |
| **sîvok** | cihê êvitî an jî belbûyî yê ku ji ber lêdaneke tund di laşî de çêdibe; gilê |
| **sîwanok** | kulîlkek e |
| **sîwak** | darikê devpaqijiyê; miswak |
| **sîx** | 1. pîjên daran ên girs2. şîşikên hûnanê |
| **sîxme** | 1. darikên sertûj 2. kelem |
| **sîxur [I]** | cureyekî heywanên pîjpîjî ye |
| **sîxur [II]** | hevkarê nepenî yê neyêr; casûs |
| **sobe** | alava germkirina avahiyan a ku dûyê wê bi riya boriyan derdikeve derve |
| **sobevan** | pîşekarê çêkirina sobe û lazimiyên sobeyan |
| **sober** | avjen, melevan |

| | |
|---|---|
| **soberî** | avjenî, melevanî*“heft soberiyên kerê hene, dikeve avê giştan ji bîr dike” |
| **soberî kirin** | avjenî kirin, melevanî kirin |
| **sofik** | telaşê tayî, kelefe |
| **sofî** | dîndarê ku girîngiyê dide îbadetan; xwedênas*“sofiyê remezanê, wek kerê dû garanê” |
| **sohe** | sobe |
| **sojer** | sotîner |
| **sol** | pêlav *“lingê xwe mekesola teng” |
| **-sol dan destan** | hatin qewirandin |
| **solbend** | 1.pêlavfiroş 2. tehmîrkarê pêlavan |
| **soldank** | 1. derdan û paçika solê 2. di ber deriyan de cihê ku pêlav lê tên danîn |
| **soldirû** | solbend *“soldirû pêxwas in, cildirû bêkiras in” |
| **sole** | bistikên garisan |
| **solîn [I]** | coya avê ya ku di bin axê re hatiye çêkirin û di bin kolan, mal û cadeyan re diçe |
| **solîn/solîne [II]** | 1. zeviya kulîlkan 2.cihê çandin û firotina gulan; gulistan |
| **sond** | ehd, yêmîn, qesem*“derewîn, pir **sond**a dixwin” |
| **sond xwarin** | ehd û qesem kirin *“carekê rêwiyek di ber ziyaretekê re derbas dibû, lê vegeriya û got: ‘Xwedê dizanê min çend caran derewînî bi serê te **sond xwariye’**; ziyaretê jî got: ‘min jî gelek caran mala te xera kiriye lê tu bi xwe nehesiyayî’ ” |
| **sone** | werdek |
| **sor** | rengê xwînê  *“gayê **sor,** sortiya xwe bernade” |
| **sor û gizêrî bûn** | qelew bûn û xwîn hatin dêman |
| **soravk** | boyaxeke sor a ku hin jin li lêv û nenîkên xwe didin |
| **sor bûn** | **1.** wekî rengê xwînê bûn **2.**(mêwe) stewîn 3. mehcûb bûn*“gul, li gulê dinêre û **sor dibe**” |
| **sorcîn** | rengê qehweyî |
| **sordîn** | kevirên meht ên ku ji bo sewalan xwêyê li serê direşînin |
| **sorewêl/sorewilk** | teyrekê avî yê gerok û rengsor e |

| | |
|---|---|
| **sorgevez** | sorê tîr û tarî |
| **sorik** | 1.pijikên sorsorî 2. cureyekî nexweşiyê ye3. giyayekê qamîşî ye |
| **soring** | **1**. nexweşyek e 2. boyaxeke giyayî ya sor e |
| **sorîçk** | endamê ku xwarina daqultandî tê re derbasî aşikê dibe |
| **soromoro bûn** | (ji ber serma, şerm û hêrsê)reng avêtin û çilmisîn |
| **sorsorik** | **1**. sorîçk 2. cureyekî darên biyanî ye3. berên dara sorsorikê |
| **sosik** | cureyekî bihukan e |
| **sosin** | cureyekî kulîlkan e |
| **sosret** | ecêb, xerîb, seyr |
| **sotin/disoje/ bisoje** | şewitandin |
| **sotîner** | bişewat, agirîn |
| **sox** | **1.** rezîl û riswa **2.** mehcûb |
| **sox û sinix** | - rezîl û riswa |
| **sox bûn** | **1**. bi nebaşiyê navdar bûn **2**. rezîl û riswa bûn 3. mehcûb û şermezar bûn |
| **soxe** | **1.** mîrate **2**. kambax û merez |
| **soxe man** | - **1.** ji mîratxuran re mîrate man 2. li xwediyan merez bûn |
| **sox kirin** | **1.** nav û nûçikên nebaşiyê li ser xistin2. mehcûb û şermezar kirin3. rezîl û riswa kirin |
| **soy** | namûs û şeref |
| **soz** | **1**.peyman, ehd 2.gotin û biryar *“ma sozbûne toz?” |
| **sozê mêrên berê** | sozê bê hîle û xurde |
| **sozdar** | kesê ku biryarek li ser xwe vebiriye; peymandar |
| **soz dan** | peyman vebirîn |
| **sparte** | **1.**emanet 2. peywira taybet |
| **spartin/dispêre/bispêre** | **1**. radest kirin, teslîm kirin 2. emanet kirin*“kerê xwe rind girêde, paþê **bispêre** Xwedê” |
| **spartin axê** | mirî di gorê de danîn û serê gorê nixamtin |
| **spas** | teşekur |
| **spas kirin** | teşkur kirin |
| **spehî** | **1**.xweşik 2.bedew3.delal 4.boş *“dar bi berê xwe ve spehî ye” |

| | |
|---|---|
| **spehîtî** | ciwanî, rindî |
| **spêde** | destpêka rojê; elind, berbang |
| **spêle** | tiştên ku di şevereşan de bi ber çavê mirovan dikevin lê di rastiyê de ew tunene |
| **spî [I]** | rengê berfê |
| **spî [II]** | cureyekî heşeratên ku wekî kêçan dikevin nava por û cilan |
| **spiya xwe bi peretî firotin** | ji kirêtiyên xwe re di bazara qencan de cih veqetandin |
| **spiyên xwe kuştin** | di halê xwe yî xirab de ketin |
| **spîçolkî** | çilmisî |
| **spî kirin** | qeşartin, qalik jê kirin |
| **spîldax** | herş |
| **spîldax bûn** | herişîn |
| **spîldax kirin** | herişandin |
| **spîlk** | spîtk |
| **spînda**r | dara spingê |
| **spîtale** | tişt an jî mirovê rengspî |
| **spîtayî** | **1**. rewşa rengê berfê2. şîr û adanên şîrî |
| **spîtk** | **1.** di çavan de beşa spî ya ku bîbik di nav de ye 2. di hêkan de aviya zelal a ku li dora zerdikê ye |
| **spîxur** | **1.**çiriz 2.çikûs 3. kirêt *“axayê **sipîxur**, bê xulam dimîne” |
| **standin/distîne/bistîne** | 1.wergirtin 2.kirîn |
| **stewandin/distewîne/ bistewîne** | **1**. kemilandin 2.gihiştandin 3.pijandin 4.terixandin |
| **stewîn/distewe/bistewe** | 1.kemilîn 2.gihiştin 3. pijîn 4.terixîn |
| **stewl** | tewleya dewar, ker û hespan |
| **stewr** | heywana ku berê xwe negirtiye û avis nebûye *“çêleka stewr, be şîr e jî” |
| **stewr bûn** | (sewal) ber negirtin |
| **stêle** | beredayî |

| | |
|---|---|
| **stêng** | giyanewereke jehrdar, û rengsor e; kunên xwe di ax û keviran da çêdike mêşhingivan dixwe û ziyanê dide |
| **stêr** | cismên ku bi şev li esmên dibiriqin |
| **stêr xuricîn** | stêr rijîn |
| **stêrk [I]** | stêr |
| **stêrka xwe bi roj dîtin** | tê gihiştin ku çi sosretî dê bên sêrî |
| **stêrk ji esmên anîn warê** | tu kar ji destan nefilitîn |
| **stêrk [II]** | nikilê ku bi serê lûleya tifingan ve ye û bi kêrî nîşangirtinê tê |
| **stêrk girtin** | nîşan girtin |
| **stêrk [III]** | kepirkeke ku di ber dîwarê malê de çêdikin da ku xwarin û pertalan li ser daynin |
| **stêrnasî** | zanistên ku pisporiya wan nasîn û danasîna gera stêran e |
| **stî** | xatûn, xanim, banû |
| **stran [I]** | **(**hevîr û hwd)hasilkirin |
| **stran [II]** | kilam, goranî |
| **stranbêj** | dengbêj |
| **stran/distrê/ bistrê** | **1.** kilam gotin 2.(hevîr û hwd)hasil kirin *"hevîr çiqasî **bê stran,** nanê wî ewqas tahmê dide" |
| **strî** | di çêre û daran de cihê tûj ê ku dest ê mirovan re diçe; kelem, pîj, dasî *"cîranê nebaş **stri** yê ber çavê mirov e" |
| **strîzerk** | çêreyek e |
| **stro** | şaxên bi serê hin ajalan ve; qiloç *"malê dinê, **stro**yê mêran e" |
| **strû** | stro *"bizina ku kok bû, dê **strû**yê xwe di kendalan hilde" |
| **stû** | endamê ku sêrî bi cendêk ve girêdide, qirik |
| **stû di rû de hatin** | Bê hemdî xwe xewre çûn an jî ji ser hişê xwe çûn |
| **stû bi binî ve bûn** | neheqî kirin û rastî sezayê neheqiya xwe hatin |
| **stû hingaftin** | serî lê xistin/ser jê kirin |
| **stûbend** | du bendikên ku ji dêla kemberan çeperast tên girêdan (du serên aliyekî li qûna şalî ve tên girêdan û ên din jî di ser milan re bi pêşiya şêl ve tên girêdan) |

| | |
|---|---|
| **stûbir** | **1.** bivirê celadan; serbir **2**.mêrkujê bêminet |
| **stûdirêj** | cureyekî sewalên kûvî ye û stûyê wê wisa dirêj e ku devê wê digihêje belgê daran |
| **stûkur** | katara stûyî |
| **stûqulk** | stuyê dirêj û zirav |
| **stûn** | **1.** pêsimtek, kêran 2. singên dirêj ên ku pê konan vedigirin ***"** **stûna** zilmê çiqasî qalind be, ewqasî zû dişkê" |
| **stûr** | **1**.nezirav 2.qelew *"stûyê stûr,ji gayê cot re namîne" |
| **stûr bûn** | 1.zirav nebûn 2.qelew bûn |
| **stûr kirin** | **1**.zirav nekirin 2.qelew kirin |
| **stûrî** | **1**.neziravî 2.qelewî *"her tişt ji ziraviyê dişkê, mirov ji **stûri**yê" |
| **stûvank** | gerdenî |
| **stûxwar** | 1. belengaz 2.reben |
| **su hatin** | xeyidîn |
| **suhbet** | hevpeyvîn |
| **sukûnet** | **1**. aramî 2. jiyana bêteqereq |
| **sukûneta derûnî** | aramiya giyanî |
| **sulh** | aştî |
| **sur** | 1.ba 2.serma |
| **surandin/disurîne/bisurîne** | 1. mist dan 2.tev dan 3. ziyîn |
| **Sureya** | gerestêrkek e |
| **surperî** | bedewtira cinan |
| **surşirîn** | dilrevîn |
| **suxre** | 1. xebata nanoziko 2. olam |
| **suxte** | şagirdê zanistên dînî; feqîh |
| **sûc** | Tawan ***"sûc** sê wî ye, kes lê xwedî dernakeve" |
| **sûcdar** | tawanbar |
| **sûçe** | goşeya derve; çivange |
| **sûçeber** | kevirê çivangeya dîwêr |
| **sûd** | **1**.menfiet, berjewendî 2.fayde, behre |

| | |
|---|---|
| **sûd wergirtin** | kelk jê wergirtin |
| **sûdperest** | 1.kêmfirsend 2. keysperest |
| **sûk/sûq** | **1**.çarsî 2.erase *“ne ji fesadan be, rovî dê here **sûk**ê” |
| **sûlav** | şelale, şîp, sîpel |
| **sûr** | dîwarê kelehê; beden |
| **sûre** | ji 114 beşên Quranê beşek |
| **sûret** | **1**. dêm 2. gep |
| **sûs** | rehên nebateke tahmxweş e û berê dewsa şêkir dihate bikaranîn |
| **sûse** | **1**. sîxurê ku kozikên neyêr teselî dike 2. (ji bo lêgerînekê) êrîşa berfireh 3. sîxuriya bi darê zorê |
| **sûsik** | cureyekî çivîkan e û hêkên wan pir biha ne |
| **sûsmar** | tîmsah |
| **sût** | rengê hêşîn ê ku dişibihe keskê çêreya ter lêbelê birqonek e; kesber |
| **sûtal** | **1**.satore 2.şeşerût 3.bêkêr, bêbine 4.eware, ewan |
| **sût û sûtal** | betalên ku li kuçeyan beredayî digerin |
| **sûtar** | **1**.wêrek **2**.şêrdil |
| **sûtan/disû/bisû** | 1. xar kirin 2.tûj kirin 3.zot kirin |
| **swîr** | tama xwêyê, şor |
| **swîr bûn** | şor bûn |
| **sûxar** | bistikên birincê ter |
| **sûyîn/disû/bisû** | sûtan |
| **sûzenek** | nexweşiya piştêşê |
| **sûzenî** | pineyê ku di dema kirasan de jin didine ber xwe |

# Ş

| | |
|---|---|
| **Ş/ş** | tîpa bîst û sêyemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke pêşezmandevî ye û di belavbûna wê de ziman li ser diranan dişide û awayê belavbûna wê fîzek û hişk e |
| **şa [I]** | **1**. bextewar2. kêfxweş 3. dilrehet |
| **şa [II]** | **1**. şah 2.bijarte |
| **şabad** | bajar an jî cihê rûniştina şahekî |
| **şabal** | şaper |
| **şaban** | şara ku davêjin ser serê bûke û zava vedike |
| **şabaş** | 1.bexþîþ 2.xelata daholvên 3.qenciya mezin *“gava ku ba bê **şabaş**an bidêr, ba neyê guhê xwe bidêr” |
| **şabaş ji Xwedê re** | **-** şikir ji Xwedê re ku ev rewþa ku ez tê de me bexişandiye min |
| **şa bûn** | kêfxweş bûn |
| **şaciwan** | keç an jî jina ku ji hemûyan bedewtir tê hilbijartin |
| **şad** | şa *“bi mirinê, dil şad nabe” |
| **şad bûn** | şa bûn |
| **şadiman** | dilfireh |
| **şadirvan** | hewz, lîç, gol, rûbar an jî zeryaya ku bi kêrî soberiya melevanan tê |
| **şadî** | 1.kêfxweþî 2. dilrihetî |
| **şad kirin** | şa kirin |
| **şafir** | 1. çola dêm, bêdar û vala 2. cureyekî çêreyê ye |
| **şag** | **1**. şak 2. newal |
| **şagenim** | genimê bijare |
| **şagirt** | 1.telebe, xwendekar 2.feqîh 3.kesê li ber destê hostayekî karekî dike; pîşekarê nû |
| **şagul** | gula hera bedew |
| **şah** | key |
| **şahane** | 1.bijarte 2.tiþtê layiqî mîran |
| **şahbanû** | keybanû |
| **şahbaz** | teyrê baz |

| | |
|---|---|
| **şahbender** | nûnêrê dûgelê yê li derveyî welêt, sefîr |
| **şahbenderî** | sefîrtî |
| **şahbenderxane** | sefaret |
| **şaheng** | serok û mîrê komeke mêşhingivan |
| **şaheser** | pir bedew |
| **şahid** | kesê ku bûyerek dîtiye; guwah *“ **şahid**ê roviyî, boçika wî ye” |
| **şahidî** | guwahî |
| **şahî** | çalakiya kêfxweþiyê *“kesîb ne li şînan e, ne jî li **şahi**yan e” |
| **şahîk** | **1**.rewþen, ronak 2.meht, şimşimot |
| **şahmar** | marê herî girs |
| **şahmerdan** | egîdê egîdan |
| **şahreg** | reha ku xwînê ji dilî belavî cendêk dike |
| **şahrê** | **1.**riya sereke 2.riya şoşê |
| **şahsiwar** | sersiwar |
| **şahtî** | keytî, mîrtî |
| **şahyar** | wezîr, kizîr |
| **şahzade** | zarokên şahan |
| **şair** | helbestvan |
| **şajin** | seroka jin; keybanû |
| **şajina bedeweiyê** | di nav hinkufan de jina hera bedew |
| **şak** | şaxên daran ên ku bi alîkariya dareke din bilind dibin |
| **şa kirin** | kêfxweþ kirin |
| **şakûl** | amûreke ku pê mîhenga karên avasaziyê tê dayîn |
| **şal** | kinca ku ji navikê berjêrtir tê lixwekirin û piranî aîdî mêran e |
| **şalgerdan** | kefî |
| **şalok** | kêlindî |
| **şalûfe** | nanê lewaşe yê ku toraq, penîr û xwarinên din dikine navê û piştî rûnkirinê li ser sêlê dipijînin |
| **şalûl** | çivîkeke dengxweş e; bilbil |
| şalûz | melaq, laloş |

| | |
|---|---|
| şalûzî | melaqtî, laloşî |
| şalwar | cureyekî kincên derveyî yê ku bi ser derpêyî de tê lixwekirin |
| şalyar | 1. walî, parêzgar 2. wezîr |
| **şalyarî** | **1**.walîtî, parêzgarî **2**. wezîrtî |
| şambelot | 1.cureyekî daran e 2.berên vê dare yên ku qelandî tên xwarin |
| **şamik** | elok, elelok |
| **şamirîşk** | elok |
| **şamû** | şehê ku pê hirî tê şikinandin |
| **şan [I]** | mil |
| **şan [II]** | **1**. şohret, navdarî 2.karê ku baş pê tê zanîn; pisporî *”dizî ne şanê mêran e, para segan e” |
| **şanê xwe derxistin** | xwiyê xwe yî nebaş nîşan dan |
| şanaz | 1. dilşa2. serbilind |
| **şanaz bûn** | **1**. dilşa bûn 2. pê serbilind bûn |
| **şanazî** | **1**.îftixar, xawên 2. serbilindî |
| **cihê şanaziyê ye** | layiqî îftixarê ye |
| şancûl | bazin an jî pîjê |
| **Şande** | stûyê kûçikan |
| **şande** | heyet |
| **şandin/dişîn e/bişîne** | bi rê kirin, hinartin |
| **şandî** | **1**. qasid **2.**peyamber |
| **şane [I]** | **1.**elamet **2.**cazibiyet *“bila lawik **şane** be, bila miaş qet tune be” |
| **şane [II]** | cihê ku ji hin xaneyên biçûk pêk hatiye û mêşa hingivî hingivê xwe lê datîne; keware |
| **şane [III]** | di laşê giyandaran de xaneyên biçûk; hucre |
| **-şaneya xwînê** | hucreya xwînê |
| **şane [IV]** | koxikê notirvanan |
| **şaner** | çavdêr |
| **şanenas** | pisporê di ware şaneyên giyaneweran de de |

| | |
|---|---|
| **şanenasî** | zanistên ku lêkolînan li ser şaneyên giyaneweran dike |
| **şanenav** | îmze |
| **şanese** | kûçikê notirvanan |
| **şaneşîn** | şanişîn |
| **şanik** | **1.** xal, deq, nîşan **2.**elamet, berate |
| **şanişîn** | **1.** cihê bêhnvedan û rûniştina şahî **2.**eywana li ser banî |
| **şanî** | **1.** nîşan **2.** rawêjer |
| **şanî dan** | **1.** nîşan dan **2.**pêşan dan **3.**araste kirin |
| **şano** | berhema wêjeyî ya ku li ser dikê tê pêşandan |
| **şanogeh** | cihê ku berhemên şanoyê lê tên pêşandan |
| **şanoger** | lîstikvanê şanoyê |
| **şanogerî** | hunera pêşkêşkirin û derhêneriya şanoyan |
| **şanşanok** | lîstikeke zarokan e |
| **şapanosî kirin** | karê xwe baş neanîn cih |
| **şapat** | **1.** karesat, bobelat **2.** ezab, xezeb |
| **şape** | şepe, aşît |
| **şaper** | per û baskên firindeyan |
| **şapik** | cureyekî potikan ê ku mildirêj, bê pêsîr û bê bişkojk e |
| **şar [I]** | bajar, şeher |
| **şar [II]** | laçik, destmal *“serê min bi **şar** e, çi bikim dilê min bi jehr e” |
| **şarandin/dişarîne/bişarîne** | **1.** germ kirin **2.** dijwar kirin **3.** azirandin **4.**arandin |
| **şarax** | ecûr |
| **şaredar** | serokê belediyeya bajarekî |
| **şaredarî** | belediyeya bajêr |
| **şarestûn** | kêran |
| **şarestûn kirin** | kêran avêtin ber |
| | 379 |
| şayese kirin | |

| | |
|---|---|
| **şareza** | **1.**kesê ku li bajaran mezin bûye û hay ji çerxa felekê heye 2.pispor 3.zana4.beled şarezahî **1.** pisporî **2.** zanatî **3.** Beledî **4.** pîşekarî |
| **-şarezahiya hunerî** | pisporiya di qadekî an jî pîşeyekî de |
| **şarêz** | nexweşiyeke pidûyên diranan e |
| **şaristan** | **1.**medeniyet **2.** avadanî |
| **şaristanî** | têkildarî medeniyet û avadaniyê |
| **şarîn/dişare/ bişare** | **1.** kel bûn, germ bûn **2.**arîn |
| **Şaş [I]** | kesê ku reşahiya çavên wî ne di cihên asayî de ne*"ji milkan aş, ji jinan jînên **şaş**, ji mêran mêrên ne bide pêş ne bide paş" |
| **şaş [II]** | 1.çewt **2.** xulp **3.** kesê ku xwe ji ber tires an jî şermê ji bîr dike; şepirze |
| **şaş bûn** | **1.**xeletî kirin **2.** mat man **3.**şepirze bûn |
| **şaşik** | egal |
| **-şaşik girêdan** | **1.** Egal dan serê xwe **2.** Pîneyekî tenik li dora serê xwe alandin |
| **şaşî [I]** | **1.**çewtî **2.** xulpî **3.** şepirzetî |
| **şaşî [II]** | rewşa nebûna reşahiya çavan di cihên wan ên asayî de |
| **şaşî kirin** | **1.** çewtî kirin **2.** xulpî kirin **3.** şepirzetî kirin |
| **şaş kirin** | **1.**gêj kirin **2.** mat kirin |
| **şaş man** | mat man |
| **şaşwaz** | matmayî |
| **şaşwaz bûn** | mat û mehtel mayîn |
| **şaşwaz kirin** | mat û mehtel kirin |
| **şatik** | katara stûyî |
| **şatir** | **1.** kesê ku kelûpel, nîşaniyên bûkan û nameyan digihîne xwediyên wan; pîlik **2.** Hevalbend |
| **şato bato** | tewş |
| **şato bato xeber dan** | bi awayekî tewş axaftin |
| **şavêr** | parav, çivêl |
| **şavêrî [I]** | paravî, çivêlî |
| **şavêrî [II]** | kêmîştahî, bêmehdetî |
| **şax** | **1.** çiya **2**.çiqilê dare **3.**bir **4.**malbend **5.**liq **6.**qiloç **7.**zîlê çêreyê |

| | |
|---|---|
| **-şax vedan** | **1.**zîl vedan **2.** bişku dan |
| **şaxur** | zinar |
| **şayen** | layiq, seza, hêja |
| **-şayenî pesnê** | sezayî medhê, hêjayî pesnê |
| **şayese** | **1.**karê sêwirandî; teswîr **2.**xêz |
| **şayese kirin** | **1.**sêwiran-din **2.**xêz kirin |
| **şayeste** | **1.**birûmet **2.**rêzdar |
| **şayid** | bijîşk |
| **şayiş** | **1.** tatêl, keser **2.**tirtûl |
| **şayiş kişandin** | **1.** Ketin tatêlê **2.**tirtûlê kulê pê girtin **3.**keser kişandin |
| **şazde** | **1.** hejmara beriya hevdehan û piştî pazdehan **2.**jimareya 16'an |
| **şazdehem(-*în*)** | di rêza şazdehan de |
| **şe/şeh** | alava şikinandina por û hiriyê |
| **-şeyê piyî** | ji qeydika piyî hetanî serê tiliyan koma hestî û movikên ku di piyên mirovan de ye |
| **şeb** | şew |
| **şebeng** | **1.** rengên ku ji rengên sereke hatine darijtin **2.** xeyala gerok a ku kesê di xewê de dibîne; qeretû |
| **-şebenga rojê** | rengên keskesorê |
| **şebikîn/dişebike/bişebike** | li hev alîn |
| **şefeq** | aso, ufuq |
| **şefran** | zehferan *"ker, çi dizane **şefran** çi ye" |
| **şeftalî** | xox |
| **şeftûl** | **1.** xwar **2.** çewt |
| **şeher/şehir** | bajar |
| **şehitandin/dişehitîne/bişehitîne** | tiştê negotin û nekirinê gotin û kirin |

| | |
|---|---|
| **şehitîn/dişeh ite/bişehite** | tiştê negotin û nekirinê qewimîn |
| **şehîd** | **1.** cangoriyê di riya Xwedê de **2.**pakrewan |
| **-şehîd ketin** | di riya Xwedê de giyanê xwe dan *"riya azadiyê, bi xwîna **şehîd**an ronak dibe" |
| **şehîn** | terazû |
| **şeh kirin** | şikinandin |
| **şehmar** | çilpê |
| **şehriyar** | şaredar |
| **şehriyarî** | şaredarî |
| **Şehrîwar** | Kelûya Simbilê |
| **şeht** | kêmlebatê ku nikare xwe li ser lingan bigire |
| **-şil û şeht** | şileke û kêmlebat |
| **şehte** | qiravî |
| **şehwet** | **1.** xwestek **2.**xwesteka zayendî |
| **şek** | **1.** lêdana sivik **2.** kîteyeke ku gava çend caran li ser hev tê gotin nêrî radibin ser lingên xwe yên paşîn **3.** beranê ji du salan mezintir |
| **-şek lê dan** | **1.** qorç lê dan **2.**du tişt hêdîka li hev xistin |
| **şekal** | **1.** cureyekî solên berê ye **2.** sola ku dawiya wê di bin lingan de hatiye şikandin û wisa hatiye pêkirin |
| **-şekal bi lingan ve kirin** | xort û xama zewicandin |
| | 380 |
| ***<u>şemal</u>*** | |
| **şekerok** | kesê ku bi jinekî re direqise |
| **şekêrt** | şikarte |
| **şekir** | şirîniya ku ji silq û leveneke taybet tê bidestxistin *"Şam **şekir** e, lê welat şirîntir e" |
| **-şekirê hûr** | şekirê hêrandî yê ku dişibihe êrd *"hevalê te bibe **şekirê hûr** jî, xelas meke" |
| **-şekirê kabik** | şekirê ku çargoşe hatiye birîn |
| **-şekirê kaç** | şekirê ku çargoşeye lê direj hatiye birîn |
| **-şekirê qend** | şekirê ku weke kerpîçan hatiye birîn |
| **-şekirê heqîde** | şekirê şûşekî |

| | |
|---|---|
| **şekirdank** | amana ku şêkir dikinê |
| **şe kirin** | **1.**pê karîn, qedandin, şiyan **2.**şeh kirin |
| **şekirmiz** | nexweşiyek e |
| **şekirnok** | cureyekî şekirên ku nokeke qelandî dikine navê |
| **şekok** | cureyekî fêkiyên çolê ye; hirmiya biyanî |
| **şel [I]** | ronahiya nîvî |
| **şel [II]** | parçeyê ku mezin hatiye qutkirin |
| **şelaf** | **1.**melaq **2.**laloş |
| **şelafî** | **1.**melaqî **2.**laloşî |
| **şelafî kirin** | **1.**melaqî kirin **2.** laloşî kirin |
| **şelal** | giya û darên ji hev dûr mane |
| **şelal bûn** | bi dûrî hev ketin |
| **şelal kirin** | ji hev bi dûr xistin |
| **şelaq** | qemçik |
| **şelaq kirin** | bi qemçikan lê xistin |
| **şele/şeleg** | barê piştan;piştî |
| **şelegan** | her tiştê girs û mezin; geltegan |
| **şelik** | parzûnê şîrdotinê yî ku didine ser devê qûşxaneyê û paşê didoşin |
| **şelipîn/dişeli pe/bişelipe** | **1.**tehisîn, şiqitîn **2.** şehitîn |
| **şeliq** | şilop |
| **şeliqîn/dişeli qe/bişeliqe** | **1.**(çav) êşîn û xerêf girtin **2.**(şeq û binçeng) kul bûn û pîrotankî bûn *“çavê **şeliqî,**ji ê kor çêtir e” |
| **şelîn/dişele/ bişele** | **1.** (mar) bi ser zikê xwe kişîn û çûn **2.** wekî maran kişîn |
| **şelşelî** | parçeparçeyî |
| **şelûf** | cûcika nêr |
| **şemal** | **1.** rewneq **2.**rewşen **3.**çira |
| **-şemal dan** | **1.** rewneq dan **2.** rewşen bûn |
| ***<u>şemalk</u>*** | |
| **şemalk** | find |
| **şemate** | qalebalî û têkilhev-bûna dengan; dengûdor |

| | |
|---|---|
| **şembûz** | sewala barkêş a nehs û eks |
| **şembûz** | bûn (sewala barkêş) veciniqîn û nehs bûn |
| **şemendefir** | navgîneke raguhastinê ya ku ji makîneyeke serkêş û çend selikên siwaran û baran pêk tê |
| **şemitandin/ dişemitîne/bişemitîne** | **1.** şiqitandin, hilisandin **2.**gindirandin **3.**tîlê xistin |
| **şemitî** | **1.**şiqitî **2.** Gindirî *“hevalê lingê **şemitî**, hey Xwedan e” |
| **şemitîn/dişemite/bişemite** | **1.**şiqitîn, hilisîn **2.**gindirîn *“hesp li ser çar lingan diçe, dîsa jî lingên wî **dişemitin** û dikeve” |
| **şemixîn/dişemixe/bişemixe** | (xurek) afnikî bûn |
| **Şemî** | roja piştî înê, roja yekemîna a hefteyê |
| **şemîtok** | **1.**şimşat, şimşimot **2.**qeşa û berfa ku li serê tê şiqitîn; tîl |
| **şemkur** | pezkovî |
| **şemûk** | **1.**pêderî, bermal **2.**hevşî |
| **şemûz** | şembûz |
| **şene** | alaveke çandiniyê ya ku çend heb tiliyên wê hene û pê giya û zad tê berhevkirin; çartil |
| **-şene kirin** | bi çartilê qirş û qeselê zevî û mêrgan berhev kirin |
| **şeng** | **1.**şên **2.**peroşmend **3.**kêfxweş |
| **şengal** | kezwan |
| **şengebî** | cureyekî daran e |
| **şengebûk** | bûka bedew, şox û şeng |
| **şengist** | **1.** unsur **2.**hêman |
| **şengiste** | cihokên ji bo xîmê avahiyekê kolandî; binetar |
| **şep** | dengê lêdana bi kefa destî; tep |
| **şepal** | **1.**şêra mê **2.**bejna lihevhatî û xwînşirîn; bedew **3.**ferxê şêrî |
| **şepane** | bizmar |
| **şepane dan** | bizmar kirin |
| **şepe** | aşît, renî |
| **şepêl** | **1.** pêl **2.** her pêleke rêzepêlan |

| | |
|---|---|
| **şepilandin/di şepilîne/bişe pilîne** | **1.** ji devê xwe şehitandin **2.**xwe şepirze kirin |
| **şepilîn/dişep ile/bişepile** | **1.** tengav bûn **2.** şepirze bûn |
| **şepirze** | **1.** pejmûrde, belawela **2.** perîşan, sefîl **3.** teqoze **4.** geveze |
| | 382 |
| şer | |
| **şepirze bûn** | **1.** Pejmûrde bûn **2.** perîşan bûn **3.** teqoze bûn **4.** geveze bûn |
| **şepirze kirin** | **1.** pejmûrde kirin **2.** perîşan kirin **3.** teqoze kirin **4.** Geveze kirin |
| **şepîlk** | çengên mirîşk û balindeyan |
| **şepop** | kesê ku her çi karî bike kêmasiyekî tê de dihêle/dest û piyên wî li hev dialin |
| **şepol** | şepêl |
| **şeq** | **1.** navbera her du lingên mirovan û sewalên dupêyî **2.** (sewalên çarpê) navbera her du lingên paşîn **3.** Navrana kincên wekî şal, derpê, fanorî û hwd **4.**parçe **5.** derz, qelîştek **6.**dengê ji lêdana bi kefa destî tê |
| **-şeq lê vedan** | **1.** lê siwar bûn û her lingek di aliyekî de daliqandin **2.** (sewalê nêr) daketin (a mê) **3.** ling lê dan hev |
| **şeqam** | lêxistina bi kefa destî; sîle |
| **şeq bûn** | di navê de qelişîn |
| **şeq kirin** | di navê de qelişandin |
| **şeqe** | kergît |
| **şeqên** | dengê levketina du tiştên req |
| **şeqil** | mohr, demxe |
| **şeqitandin/d işeqitîne/biş eqitîne** | **1.** fizirandin **2.**dan aliyekî |
| **şeqitîn/dişeq ite/bişeqite** | **1.**fizirîn **2.**xwe dan aliyekî |
| **şeqizîn/dişeq ize/bişeqize** | **1.**şerm kirin, fedî kirin **2.**şaşwaz bûn **3.**neçar bûn |
| **şeqle** | darên ku ji bo şewitandinê hatine şeqşeqîkirin; êzing |
| **şeqopîlo** | **1.** şeqşeqî **2.**derzderzî **3.** qelşqelşî |
| **şeqopîlo bûn** | **1.** di navranê de şeqşeqî bûn **2.**derzderzî bûn **3.** qelşqelşî bûn |

| | |
|---|---|
| **şeqopîlo kirin** | **1.** di navranê de şeqşeqî kirin **2.** derzderzî kirin **3.** qelşqelşî kirin |
| **şeqşeqî** | **1.** şelşelî, parçeparçeyî **2.**şeqopîlo |
| **şeqşewêl** | jina nelirê; qehbik |
| **şer** | **1.** ceng **2.** Pevçûn *"**şer**, bi tifinga vala nabe" |
| **-şerê bejî** | şerê li ser rûyê erdê |
| **-şerê bigirbikujiyê** | şerê xwînxuran ê li dijî reben û repalan |
| **-şerê eniyê** | di bereyekî de cenga du artêşan |
| **-şerê fezayî** | şerê li seqayê |
| **-şerê germ-şerê germ** | şerê rû bi rû; şerê eniyê |
| | 384 |
| ***<u>şeranî</u>*** | |
| **-şerê piştzeryayî** | şerê ku di parzemîneke cihê de tê meşandin |
| **-şerê sar** | şerê navtêdan, berîdan û tevdanê; şerê dek û dolaban |
| **-şerê zeryayî** | şerê di nav behran de |
| **şeranî** | lîstikeke govendan e û bi pêgiranî tê lîstin *"bûye marê nîvkuştî, hê jî **şeranî** dilîze" |
| **şerbet** | vexwarina ku ji ava mêweyên guvaştî, şekir û avê tê çêkirin |
| **şerbik** | tasa avê ya biçembil *"**şerbik** nû ye, av şirîn e" |
| **şer derxistin** | bûn sedema pevçûnan |
| **şeredev** | devjenî |
| **şeref** | **1.**heysiyet **2.**rûmet **3.** rêzdariya li nav civakê *"**şeref**, ji heyatê hêjatir e" |
| **şerenîx** | şeredev |
| **şerfiroş** | kesê ku her dem li şer û têkdanê digere |
| **şergeh** | qada ceng û pevçûnê |
| **şerîet** | **1.** hiqûqa îslamî **2.** ola bi zagon û pergal *"**şerîet**, şermê naxwaze" |
| **şerkar** | pîşekarê cengê |
| **şer kirin** | **1.** bi yekî re li hev xistin; cengîn **2.** Lê bezîn |
| **şerm** | eyb, fedî *"di dinyayê de **şerm** tunebe, hurmet jî tuneye" |
| **şermezar** | **1.** kesê ku karekî neyînî kiriye **2.** riswa |

| | |
|---|---|
| **şermezar bûn** | **1.** (ji ber karekî neyînî ve) li ber xwe ketin **2.** riswa bûn |
| **şermezarî** | rewşa kesê ku karekî neyînî kiriye an jî ji ber karekî neyînî riswa bûye |
| **şermezar kirin** | **1.** (ji ber neyîniyekê) bertek nîşan dan **2.**derew derxistin **3.** riswa kirin |
| **şermgeh** | **1.** ewret **2.**navran |
| **şermîn** | şermoke *”jina **şermînbi** şarekî, mêrê şermîn bi karekî” |
| **şermînî** | di mirovan de rewişt an jî nexweşiya şermê |
| **şerm kirin** | **1.**fedî kirin **2.** mehcûb bûn *“bide metirse, bixwaze û bistîne lê **şerm meke”** |
| **şermoke** | fediyok, şeqizok |
| **şeroke** | **1.** kesê ku pir şer û pevçûnan dike **2.**kesê ku ji şer û pevçûnan pir hez dike |
| **şerpeze** | şepirze |
| **şerpilîn/dişer pile/bişerpile** | feşkilîn |
| **şerpîn** | barişa boş |
| **şert** | merc<br>**-şert danîn** bi hev re ketin mercê |
| **şerûd** | kesê ku bi her kesî re li hev dixe; şeroke |
| **şervan** | çekdarê ku karê wî berevaniya welat û rastiyê ye; şerkar |
| **şerxwaz** | kesê ku cengê ser aşitiyê re digire |
| **şeş** | **1.** hejmara piştî pêncan û beriya heftan **2.** jimareya 6’an ***“**meha **şeş**an, kuran bibe hewşan, keçan dayne ser merşan**”** |
| **şeşalî** | şeşgoşe |
| **şeşbêj** | kesê ku gelekî diaxive û mijaran têkel dike; pirbêj |
| **şeşek** | **1.** ji şeş paran parek **2.** şeş rojiyên piştî cejna remazanê<br>**-şeşek girtin** di şeş rojên pêşîn ên meha şewalê de rojiya nafile girtin |
| **şeşem(-în)** | di rêza şeşan de |
| **şeşerût** | **1.** pêgirtî, xulamok **2.** têjikên nebaşiyê |
| **şeşgoşe** | şêweyekî endazeyî yê ku ji şeş rexan pêk hatiye; şeşalî |
| **şeşik** | **1.** kevirên bi qasî bindeq û gûzan **2.** cureyekî lîstikên zarokan a ku bi şeş şeşikan (kevirên biçûk) tê lîstin<br>**-li ser îmana xwe şeşik lîstin** di baweriya xwe de pir sist bûn |
| **şeşkujî** | şeşgoşe |

| | |
|---|---|
| **şeşper [I]** | cureyekî şalên mêran ê fireh e |
| **şeşper [II]** | cureyekî gurzên cengê ye û ji şeş parçeyan pêk tê |
| **şeşxane** | cureyekî tifingên ku şeş fîşeng dikevin ber |
| **şet** | xwar |
| **şetele** | **1.** şepe, renî, aşît **2.** teşqele, karesat<br>**-şeteleyek jê re hatin** tûşî karesatekê hatin |
| **şetrenc** | sedrenc |
| **şev** | **1.** ji avabûna rojê hetanî elindê duwazde sateen ku cîhan tê de tarî dibe; êvar **2.** tarîban ***"şev**a reş, keleha mêran e"<br>**-bi şev 1.** êvarê **2.** di tariyê de, piştî tarîbanan<br>**-şev bi ser de hatin 1.** heta tarîbanan kudandin **2.** hetanî êvarê axaftina xwe dirêj kirin |
| **şevane** | **1.** karê ku bi şev tê kirin **2.** mûçeya ku ji bo keda şevekî tê dayîn **3.** tiştê ku her şev pêk tê |
| **şevbihurk** | sohbeta êvaran a ku heta nîvê şevê didome |
| **şeveder** | kesê ku şeva xwe dûrî malê dibuhirîne |
| **şevekor** | kesê ku di şevereşê de baş nabîne an jî bi roj rengan ji hev venaqetîne |
| **şevereş** | **1.** êvara zîz a ku heyv tê de xuya nabe **2.** tarîtî ***"**heke diz hebin, **şevereş** gelek in**"** |
| **şevger** | kesê ku di xewê de ji nivîna xwe radibe û digere |
| **şevî** | şevek bi ser re derbasbûyî |
| **şevîn** | **1.** çêrandina şevê **2.** têkildarî şevê |
| **şevnimêj** | **1.** tehecud **2.** nafile |
| **şevşevok** | barçêmk |
| **şexte** | zîpikên girs; teyrok |
| **şevtirsk** | nexweşiya ji şevereşê |
| **şevyar** | nêçîra bi şevê şew dermanekê şîn î gelêrî ye û ji bo pir mebestan tê bikaranîn ***"şew** û şekir, li ba şivanan yek in**"**<br>**-şew û şekir ji hev nas nekirin** başî û nebaşî ji hev veneqetandin |
| **şewat** | **1.** sotin **2.** agirpêketin **3.** jan ***"şewat** bi erdê keve, ter û hişk tev dişewitin**"**<br>**-şewat berdan dilan** pir êşandin |
| **şewate** | **1.** ardû 2. agirê ku pê êgir pê dixin |
| **ewbş** | nexweşiyeke sewalan e |

| | |
|---|---|
| | **-şewba çivîkan** qira sewalên bibaskên malê û firindeyên çolê; dimşînk, nikilreş |
| **şewişandin/ dişewişîne/bi şewişîne** | çelqandin |
| **şewişîn/dişe wişe/bişewiş e** | **1.** tehisîn **2.** milmilîn, weşweşîn |
| **şewitandin/d işewitîne/biş ewitîne** | **1.** pê xistin **2.** sotandin **3.** êşandin |
| **şewitîn/dişe wite/bişewit e** | **1.** pê ketin **2.** sotin ***"**divê mirov di agirê mezin de **bişewite"** |
| **şewk** | çengala ku pê masî tên girtin; sincaq |
| **şewl** | şemal, rewneq |
| **şewl dan** | rewneq dan |
| **şewlok** | amûreke gêrebayî ya ku piştî çûna gêrebayê tê pêxistin |
| **şewlpîv** | amûra ku leza rewneqa heyî dipîve |
| **şewq** | **1.** şemal **2.** ronahî **3.** çirûska boş ***"**dilê fireh, **şewq** û çira ye**"**<br>**-şewq vedan** çirûsk vedan<br>**-şewqê dan newqê** tu dibêjî qey pir pak e lê di rastiyê de ne wisa ye |
| **şeyda** | sewdaser |
| **şeydatî** | sewdaserî |
| **şeyîn/dişeye /bişeye** | (hesp) hîrîn, şêyeşê kirin |
| **şeyt** | **1.** toterîk **2.** taye |
| **şeytan** | cinê ku ji Cn. A- dem eleyhiselamî re sicde nebiriye, Iblîs ***"şeytan**ê merivan, bi merivan re ye**"**<br>**-şeytan dibêje...** heke li dû nefsa xwe herim ez dê...<br>**-şeytan pê** kenîn cinabet bûn<br>**-şeytên zor dayê** nefsê zor lê kir ku ji rê derxe |
| **şeytanî** | fesadî û xirabî |
| **şeytanî kirin** | fesadiya hinekan li ba hinekên din kirin |
| **şeytanok** | cureyekî bihukên ku di qalikekî helezonî de ye û pir dereng dimeşe |

| | |
|---|---|
| **şê** | dengê hîrehîra hespan |
| **şêl** | **1.** kêla dirûnê **2.** dirûnên girs |
| **şêlandin/dişêlîne/bişêlîne [I]** | hêk meyandin |
| **şêlandin/dişêlîne/bişêlîne [II]** | **1.** xesp û kosp kirin **2.** talan kirin **3.** dizîn |
| **şêlav** | **1.** lehî, lêkend **2.** coşî û peroşî |
| **şêlavk** | **1.** ava kils an jî boyaxê ya ku pê dîwar tên rengandin **2.** ava şêlo |
| **şêlik** | cureyekî zêd e û dişibihe nîskên kesk |
| **şêlim** | cureyekî sewziyên ji malbata tiviran e |
| **şêlimtirşk** | tirşiya şêliman |
| **şêlî** | nezelal |
| **şêlî bûn** | **1.** zelaliya tiştê avî winda bûn **2.** zelaliya bînahiya çavan winda bûn ***"**av, di serekaniyê de **şêlî dibe"** |
| **şêlî kirin** | **1.** zelaliya tiştê avî winda kirin 2. zelaliya bînahiya çavan winda kirin |
| **şêlîn/dişêle/bişêle** | (hêk) meyîn |
| **şêl kirin** | **1.** kêl kirin **2.** girs dirûn<br>**-şêl li şintira xwe nexistin** gincirên xwe nedirûn û pê de daliqîn |
| **şêlo** | şêlî |
| **şêlşêlî kirin** | **1.** kêlkêlî kirin 2. bi kêlên girs û serobero dirûn |
| **şêmûg** | pêderî |
| **şên** | dilveker, şeng û şox |
| **şênahî** | **1.** şengî û şoxî **2.** rengînî ***"**herin **şênahi**yan, pirs bikin ji zarokan**"** |
| **şênber** | **1.** tiştê berbiçav **2.** dîtî û bînayî |
| **şênî** | **1.** niştecih, akincih **2.** dêman, ehalî |
| **şên kirin** | bûn sedema kêfxweşiyê |
| **şêr** | **1.** cureyekî heywanên çolê ye û dişibihe pilingan lê serconcix e 2. egîd ***"**cihê **şêr**an, rovî lê dikin gêran**"** |
| **şêrane** | **1.** wekî şêran **2.** kesê çavnetirs |
| **şêranî** | **1.** şêrkî **2.** Wêrekî **3.** egîdî |
| **şêrdil** | mêrxas |

| | |
|---|---|
| **şêrejin** | jina wekî şêran |
| **şêrgeh** | warê şêran |
| **şêrpence** | penceşêr, cureyekî nexweşiyê ye |
| **şêrza** | têjikê şêran |
| **şêst** | hejmara 60'î, deh heb şeş |
| **şêstem(-în)** | di rêza şêstan de |
| **şêt [I]** | **1.** dînik **2.** totikvala<br>**-şêt bûn** dîn bûn<br>**-şêt kirin** dîn kirin |
| **şêt [II]** | **1.** kêzim **2.** şiva mezin |
| **şêtî** | **1.** dîntî **2.** totikvalatî |
| **şêtxane** | nexweşxaneya dînan |
| **şêwaz** | **1.** uslûb, fesal **2.** awa, tehr |
| **şêwe** | çawaniya pêkhatina tiştan<br>**-şêwe û naverok** dîtbariya hundirîn û derveyî<br>**-bi vî êweyî** bi vî awayî |
| **şêwekar** | kesê ku ji têlên zîvîn xemlan çêdike |
| **şêwekarî** | hunera zîvhûnanê |
| **şêwenasî** | zanistên ku pisporiya wan li ser naskirina şekl, dirûv û awayê wan e |
| **şêwirgeh** | cihê danûstana agehiyan |
| **şêwirîn/dişêwire/bişêwire** | **1.** ramana yekî wergirtin **2.** danûstan ***"**berê **bişêwire**, pişt re bikire**"** |
| **şêwirmend** | hêvojkarê agehiyên durist; rawêjer |
| **şêwr** | di babetekî de wergirtina ramana pisporekî; rawêj ***"şêwr**, bi dînan re nabe**"**<br>**-şêwr gerandin** li hev civîn û babetek nîqaş kirin |
| **şêx** | serokê terîqetê ***"şêx** ne batil in, bi serê wan de hatine**"** |
| **şêxanî** | cureyekî lîstika govendê ye |
| **şêyeşê** | dengê hîrehîra hespan |
| **şêyeşê kirin** | (hesp) hîrehîr kirin |
| **şêz** | **1.** cureyekî geneyên bizinan e **2.** mêşa hespan |
| **şibake** | pace |

| | |
|---|---|
| **şibihandin/dişibîne/bişibihîne** | tiştek (di taybetmendiyan de) wekî tiştekî din dîtin |
| **şibihîn/dişibihe/bişibihe** | tiştek (di taybetmendiyan de) wekî tiştekî din bûn |
| **şidandin/dişidîne/bişidîne** | **1.** guvaştin **2.** quraftin **3.** pêçan **4.** muhkem girêdan **5.** paçik kirin |
| **şidîn/dişide/bişide** | **1.** muhkem bûn **2.** lê hatin hev **3.** xurt bûn |
| **şifa** | pakbûna ji nexweşiyekê<br>**-şifa dîtin** ji nexweşiyê rizgar bûn |
| **şifre** | razepeyv<br>**-şifre avêtin ber** razepeyvek jê re çêkirin |
| **şiftî** | zebeş |
| **şik** | guman, şubhe |
| **şikandin/dişkîne/bişkîne** | şikandin |
| **şikarte** | **1.** kel û melên aîdî jinê **2.** çandiniya kesê ku cot û cobarê wî bi xwe tuneye |
| **şikbir** | **1.** pêhesiyayî **2.** navtêdayî |
| **şik birin** | **1.** pê hesîn **2.** guman kirin |
| **şikdar** | waswasok |
| **şikev** | **1.** teşta nanî **2.** cureyekî navgînên ser avê; kelek |
| **şikevik** | **1.** xweliya ku pê kûzik tên çêkirin **2.** cêrik |
| **şikêr** | li çiyan qelîştek û çalên kûr û asê |
| **şikinandin/dişkine/bişkine** | **1.** por şeh kirin **2.** hirî, liva û mû bi şehî zax kirin |
| **şikîn/dişkê/bişkê** | şkîn |
| **şikra** | bi mebesta..., bi niyêta...<br>**-şikra sibehê ve** bi niyêta sibehê ve |
| **şil [I]** | **1.** tiştê ku aviyek tê geriyaye; neziwa **2.** avî **3.** bi têhn ***"**ban qul be, binban **şil e"**<br>**-şil bûn 1.** av bi ser de rijîn 2. baran bi ser de rijîn<br>**-şil û pil bûn** ser û kinc giş bûne weke avê |

| | |
|---|---|
| | **-şil kirin 1.** av bi ser de rijandin **2.** li ber av an jî baranê dan sekinandin ***"**barana havînê, **şil kir** binê kulînê**"** |
| **şil [II]** | **1.** şileke 2. Kêmendam<br>**-şil bûn** seqet man |
| **şilahî** | **1.** rewşa têgerîna aviyekê; neziwatî **2.** rewşa seqetmanê |
| **şile** | **1.** cureyekî gulan e **2.** ava mêweyên guvaştî |
| **şilegewr** | rengê ku bêteşe ye û baş diyar nabe |
| **şileke** | **1.** kesê ku endameke wî felc bûye; goc **2.** nivîşkan, kêmlebat |
| **şilemenî** | **1.** şilahî, têhnahî **2.** tiştên avî |
| **şilepor** | endamê zayendî yê jinan |
| **şilêl** | giloka hewirmişî |
| **şilf** | **1.** kêrik 2. Rût<br>**-şilf û tazî** rût û repal |
| **şilfik** | **1.** di alavên qutkirinê de beşa hesinî **2.** Rût û uryan |
| **şilik** | nermahiya di serê zarokên viringî de |
| **şilî** | **1.** baran, bariş **2.** Têhnahî<br>**-şilî û şoyî** baran û lêkend |
| **şilop** | kinîşt |
| **şilope** | barana ku berf jî pê re dibare |
| **şilopilo** | tiştê ku riwînek bi ser de rijiyaye |
| **şilopilo bûn** | tiştê avî bi ser de rijîn |
| **şilove** | berfa ku dihele |
| **şiloxe** | bendikên solan |
| **şilp** | dengê şeqamê û şepilandina dêv |
| **şilpeşilp** | **1.** dengê birêveçûna di nava avê de **2.** dengê şepilandina dêv |
| **şilpeşilp kirin** | **1.** xwişexwiş kirin **2.** milçemilç kirin |
| **şilûr** | tiriyên negihiştî |
| **şilxe** | refeke mêşhingivan |
| **şim** | sola werzişê ya sivik |
| **şima** | finda ku ji kewara mêşhingivan hatiye bidestxistin |
| **şimareng** | cîleya biriqandinê |
| **şimaş** | **e** keşe |

| | |
|---|---|
| **şimik** | pêlavên dorvekirî û qulqulî, galik, pêpûçk<br>**-ji şimikê heta kumikê** ji kincên seran hetanî kincên lingan |
| **şimşal** | **1.** bilûr **2.** pîpik |
| **şimşat** | şemîtok |
| **şimşimot** | şemîtok |
| **şimşîr** | **1.** şûr 2. cureyekî darên ku belçikên wê tim şîn in |
| **şindok** | **1**. nemêr **2.** Bêkêr<br>**-şindokê mêran** kesê ku di dilqê mêran de ye lê tu mêranî jê nayê |
| **şing** | **1.** dengê şikestina şûşeyan **2.** dengê bilind ê herikîna avê; xwiş, xwişexwiş |
| **şingandin/dişingîne/bişingîne** | **1.** çingandin **2.** şeqeşeq kirin **3.** xwişexwiş kirin |
| **şingîn/dişinge/bişinge** | **1.** dengê şikestina şûşeyan jê hatin **2.** dengê bilind ê herikîna avê jê hatin; xwişîn ***"**gulan e, **şingîn**a dasan e**"** |
| **şingînî** | dengê şingînê |
| **şingeşing** | şingîniya domdar<br>**-şingeşinga nalan û hîrehîra hespan** dengên têvel ên şer û talanê |
| **şintir** | gincir |
| **şintirandin/dişintirîne/bişintirîne** | **1.** şandin hatenehatê **2.** têk birin |
| **şintirîn/dişintire/bişintire** | **1.** çûn helakê, çûn hatenehatê **2.** têk çûn |
| **şip-** | pêşgireke ku wateya heyî xurtir dike<br>**-şipşidiyayî** baş-şidiyayî<br>**-şipşîn** şînê esmanê çiksayî |
| **şipne** | şene, xermaşe |
| **şiqitîn/dişiqite/bişiqite** | **1.** şimitîn **2.** xijikîn ***"**bi dest **bişiqitî** dikarî xwe bigirî, bi ling bişiqitî dikarî xwe bigirî, lê bi zimên bişiqitî tu dê herî û herî**"** |
| **şir** | **1.** tembel **2.** Westiyayî **3.** dengê xurt ê barana boş |
| **şiratî** | teralî |
| **şir bûn** | **1.** xav bûn **2.** bêzar bûn |
| **şirb** | cureyekî daran e |

| | |
|---|---|
| **şirdan** | gerdenî ***“şirdan**a zêran winda kir, pey moriya hecîyekî sêsed gaz rê da ber xwe” |
| **şirebaran** | barana boş a bi deng |
| **şireşir** | xwşiexwiş |
| **şireşir kirin** | xwişexwiş kirin |
| **şirên** | xwişexwiş |
| **şirik** | **1.** qulik 2. rêşî 3. gulik ***“şirîk** şirîkan jîr dikin, hêwî hêwiyan pîr dikin**”** |
| **şirikşirikî** | gulikgulikî |
| **şiringe** | amûra ku pê dermanên avkî li nexweşan tê xistin |
| **şirîk** | **1.** hevkar, hevpişk **2.** hevpar *“simbil bû firîk, mele bû şirîk” |
| **şirîn [I]** | **1.** şekirîn **2.** tahmxweş |
| **şirînahî** | çêja tiştên şekirîn |
| **şirîn bûn** | **1.** tahma şêkir tê de hebûn **2.** tahmxweş bûn ***“**bi gotina helawê, dev **şîrîn nabe”**<br>**-şirîn kirin 1.** tahma şêkir tê de pêk anîn 2. tahmxweş kirin |
| **şirîn [II]** | **1.** bedew 2. qeşeng *“kezeb çiqasî **şirîn** be, şîret jê re ewqas şirîntir e” |
| **şirînmeh** | meha pêşîn a bûk û zavê |
| **şirît** | weris |
| **şirjaw** | layiq, seza |
| **şirjaw bûn** | layiq bûn |
| **şirjaw dîtin** | layiq dîtin |
| **şir kirin** | sistî kirin û xwe ranegirtin |
| **şirp** | **1.** tavilê **2.** ji nişkê ve **3.** bê navber û pê re |
| **şirtik** | zirîçka çavan; şirav |
| **şitil** | darên viringî an jî çiqilê daran ê ku ji nû ve tên çikandin |
| **şitilgeh** | **1.** zeviya şitilan **2.** firoşgeha şitilan |
| **şitî** | şimşat |
| **şitî bûn** | şimşat bûn |
| **şitî kirin** | **1.** şimşat kirin **2.** rihê xwe baş kur kirin |
| **şito** | kesê ku rihê xwe kurkiriye û fortê bedewbûna xwe dike |
| **şiv** | çiqekî darê yî nîvreq e û şivan pê pêz diajon; ço |
| **şivan** | kesê ku diçe ber pêz û wan diçêrîne; çovan ***“şivan**ê jêhatî, pêz nade guran**”** |

| | |
|---|---|
| **şiverê** | riya teng a ku tenê bi piyan tê de tê meşîn |
| **şivir** | cureyekî sewalên çarpê yên çolê ye; ask |
| **şivî** | xêza çikeçik |
| **şivîşiviyî** | tiştê ku tê de xêzên çikeçik hene |
| **şiwîn** | berhem, karpêk |
| **şiwît** | cureyekî çêreya ku nepijî tê xwarin; qiçî |
| **şixab** | behreme |
| **şixate** | qutiya kibrîtan |
| **şixir** | **1.** dara bêber **2.** palanê darînî |
| **şixre** | neqlkirina çandiniyê ji zeviyê li bal bênderê ve |
| **şixul** | **1.** kar **2.** xebat **3.** îş ***“**aş **şixul**ê xwe dike, çeqçeqok diranê xwe dişkîne” |
| **şixulandin/dişixulîne/bişixulîne** | xebitandin |
| **şixulîn/dişixule/bişixule** | **1.** xebitîn **2.** (pêketina êgir) domdar bûn |
| **şiyan/dişê/bişê** | **1.** pê karîn **2.** pêk anîn |
| **şîfon** | qedîfe |
| **şîlan** | cureyekî mêweyan e ***“**demek a gulê ye, yek a şîlanê ye**”** |
| **şîlaq** | parçeyê biyanî yê ku dikeve çavan û pê diêşin |
| **şîlav** | xweşav |
| **şîlavk** | endamekî ku pişt aşikê ve ye û xwe digihîne rûviya duwazdegirê |
| **şîmk** | pêderî |
| **şîn [I]** | **1.** reşgirêdan; matem **2.** taziye ***“şîn**a tev êlê şahî ye**”**<br>**-şîn girêdan** reş girêdan |
| **şîn [I]** | rengê esmên; hêşîn |
| **şîndar** | kesê ku kesekî wî miriye; xembar |
| **şîne** | rengê dişibihe şîn |
| **şînboz** | rengekî di navbera şîn û kesk de ye |
| **şînok** | cureyekî daran e; kezwan |
| **şîqeşîq** | dengê domdar ê cûtina benîştî an jî rêveçûna sewalên naldar |
| **şîp** | ava herikbar a ku ji cihekî bilind dirije |

| | |
|---|---|
| **şîpik** | şîpê biçûk |
| **şîr** | adana ku di her guhanî de heye *“**şîr**ê kerê, ji cehşa kerê re ye”<br>-**şîrê helal mêtin** di maleke qenc de hatin dinyayê û wisa jî mezin bûn<br>-**şîrê zikmakî ji dêv û pozî re anîn** pir tengezar kirin |
| **şîranî** | xwarinên ku şekir dikeve tev |
| **şîrbirak** | du kesên ku şîrê diyekê mêtine |
| **şîrbirinc** | cureyekî xwarina ku ji şîr, şekir û birincî tê çêkirin; birinceşîr |
| **şîrder** | sewalên bi şîrê guhanên xwe têjikên xwe dimêjînin |
| **şîre** | **1.** ava rehekan **2.** keresteyekê çir ê ku pê pirç tên rûçikandin |
| **şîregermî** | **1.** saregermî **2.** ava hênik *“ava biharê çiqasî **şîregermî** bibe jî, nikare birincî bipijîne” |
| **şîret** | **1.** nesihet **2.** tembîh**3.** hêvojkarî *“heta **şîret**an li xelqê dikî, qûna xwe bişo”<br>-**şîret lê kirin** tembîh kirin, hêvotin |
| **şîreve kirin** | **1.** zarok/sexele ji şîr veqetandin **2.** zarok hînî xwarinê/sexele hînî çêrînê kirin |
| **şîrêz** | **1.** çêreyeke ku jê zeliqok/çesp tê bi destxistin **2.** zemq *“helaw, ji **şîrêz**ê çênabe” |
| **şîrêz kirin** | bi hev ve zeliqandin |
| **şîrfiroş** | firoşkarê adana ku ji guhanên sewalan hatiye dotin |
| **şîrhe** | dîwar |
| **şîrhe kirin** | dîwar kirin |
| **şîrheram** | **1.** bêar **2.** nebaş |
| **şîrheramî** | **1.** bêarî **2.** nebaşî |
| **şîrî** | di rengê şîr de |
| **şîrmaq** | şeqam, sîle *“**şîrmaq**, li gorî rû ye” |
| **şîrove kirin** | **1.** rave kirin 2. îzah kirin |
| **şîroveker** | raveker |
| **şîrqandin/dişîrqîne/bişîrqîne** | dengê birûskê yî tîz ji tiştekî derxistin |
| **şîrqîn/dişîrqe/bişîrqe** | dengê birûskê yî tîz jê hatin |
| **şîrqînî** | dengê birûskê yî tîz |
| **şîrşêrk** | cureyekî şirînahiya ku ji şîr, şekir û ardê birincî tê çêkirin |

| | |
|---|---|
| **şîş** | hesinekî dirêj î zirav ê ku ji bo pir armancan tê bikaranîn<br>**-(tiştek) şîşî cihekî kirin** tê re kirin |
| **şîşik** | tîrikên hesinî yên ku pê fayke, gore û hwd tên hûnan |
| **şîş kirin** | **1.** bi şîşan jê re sîperek kirin **2.** tê re kirin |
| **şît [I]** | şimşat, tîl |
| **şît [II]** | aşît, şepe |
| **şît [III]** | zêrevan ***"**mirovê **şît**, bi dilê pît?**"** |
| **şîv** | xwarina danê êvarê ***"**axayê me Pilo, **şîv**a kerê me bû çilo**"**<br>**-şîva miriyan** sedeqeya serê miriyan a ku xizmên wan ên sax didine xizanan |
| **şîvik** | xwêdana ku bi laşê mirovî ve dizeliqe |
| **şkandin/dişkî ne/bişkîne** | **1.** şkestandin, parçe kirin **2.** derizandin 3. derb lê xistin |
| **şkeft** | kunên mezinên di çiya û erdê de; mixare |
| **şkestek** | **1.** derz, cerx, qelş **2.** derb |
| **şkestin/dişkê /bişkê** | **1.** derizîn **2.** derbe xwarin **3.** hûr bûn ***"**bextê feqîran hebûya, gîsnê wan di axa nerm de **nedişkiya"** |
| **şkestî** | **1.** derizî **2.** derbexur ***"**jin darê **şkestî** ye**"** |
| **şkev** | nanê ku ji hevîrê bêhevîrtirş hatiye pehtin; lewaş |
| **şkevik** | çaviyên terazûyê |
| **şkêr** | **1.** zinarên mezin **2.** hendef **3.** qûçê keviran |
| **şkêvlatok** | kûsî |
| **şkinandin/di şkine/bişkine** | şeh kirin |
| **şkîn/dişkê/bi şkê** | ***"**cêr di riya avê de **dişkê"** |
| **şofar** | sîxur |
| **şofarî** | sîxurî |
| **şohret** | navdarî ***"ohret**a çeman dar û bî, şohreta bûkan şar û temezî**"** |
| **şom** | bêpêpal, bêyom |
| **şonik** | darikê ku pê kinc û hiriyê dişon |
| **şop** | **1.** dews **2.** rêç **3.** delav ***"**hirç dîtiye, li dû **şop**ê diçe**"** |
| **şopger** | **1.** rêçajo **2.** delavdayî |
| **şop gerandin** | rêç ajotin |

| | |
|---|---|
| **şopik** | **1.** zirzeya deriyê darînî **2.** endamê zayendî yê nêrzayan |
| **şop vekirin** | **1.** delav dan **2.** rê vekirin |
| **şor [I]** | bixwê, tirş *“şirîn û **şor**, keçel û kor, li cem hev nabin” |
| **şor [II]** | xeberdan, gotin *“**şor**a xirab, zû digihêje şûna xwe”<br>-**şorê berê** gotinên pêşiyan |
| **şor [III]** | nizmkirî, daxistî<br>-**şor bûn** çemîn<br>-**şor kirin** çemandin<br>-**lêva xwe şor kirin** lêva xwe çemandin/daxistin |
| **şoravk** | **1.** ava bixwê ya ku penîrê teze dikinê **2.** ava tirşînê |
| **şorax** | erdê şorge |
| **şorbe** | cureyekî xurekê avkî ye *“**şorbe**, zik dike torbe” |
| **şorbehûr** | xurekê ku ji hûr û pizûran tê çêkirin |
| **şorbenîsk** | xurekê ku bi nîskan tê çêkirin |
| **şorbeşîr** | xurekê ku ji şîr û pirinc tê çêkirin; şîrbirinc |
| **şorebî** | cureyekî daran e |
| **şoreş** | xebata çekdarî ya ji bo standina mafekê rewa |
| **şoreşger/şor eşvan** | endamê xebata çekdarî ya ji bo standina mafekê rewa |
| **şoreşgerî** | doza mafekî rewa bi riya muxalefeteke çekdar |
| **şorge** | erdê ku di xweliya wê de şorahî heye û çêre lê hêşîn nabe |
| **şoristan** | şorge |
| **şorxweş** | zimanşîrîn |
| **şoşban** | birazava *“kî **şoşban** e, ew poşman e” |
| **şov** | zeviya cotkirî ya neçandî<br>-**şov hiştin** erd cot kirin û di wê salê de neçandin<br>-**şov kirin** erd cot kirin lê neçandin û sala dîtir çandin |
| **şox û şeng** | **1.** çîç û vîç **2.** cazibedar **3.** jina qûnek *“**şox û şeng** e, bi nav û deng e” |
| **şulux** | kesê ku dike qîjevîj; qîjqîjok |
| **şuluxî** | qîjevîj |
| **şuluxî kirin** | qîjevîj kirin |
| **şun** | paş |

| | |
|---|---|
| | **-şun de çûn** paş ve çûn<br>**-şun de xistin** paş ve xistin<br>**-şun de man** paş de man |
| **şutî** | şitî |
| **şû** | hevser |
| **şûbira** | birayê mêrê bûkê; tiyê bûkê |
| **şûjin** | derziyeke stûr e û pê devê bardan û têrikan tê dirûtin; bijûn ***"**bi derziyê neçe ser **şûjin**ê**"** |
| **şûkil** | hevserê nazenîn |
| **şû kirin** | **1.** mêr kirin **2.** zewicîn |
| **şûl [I]** | hevûrî |
| **şûl [II]** | şêl<br>**-şûl kirin** şêl kirin |
| **şûm** | nehs |
| **şûm bûn** | nehs bûn |
| **şûmirî** | **1.** jinebî **2.** mêrebî |
| **şûmî** | nehsî |
| **şûm kirin** | nehs kirin |
| **şûn** | **1.** dews **2.** war **3.** cih ***"**kevirê giran, di **şûn**a xwe de birûmet e**"**<br>**-şûna yekî girtin 1.** cînişîniya yekî kirin **2.** dewsa yekî vala nehiştin<br>**-şûna bav/dê/xwîşk/birayê min de ye** ez bi çavê nebaşiyê lê nanihêrim<br>**-şûna zarokî guherandin** binê wî paqij kirin û bi pîneyên paqij girêdan |
| **şûndiyarî** | xelata ku berdêla xelateke dayî ye ***"**diyarî qesp e, **şûndiyarî** hesp e**"** |
| **şûnewar** | **1.** mekan **2.** Welat<br>**-şûnewarên kevn** kevnewarên dîrokî |
| **şûnguhêztin** | cihguherandin, levguherandin |
| **şûnkar** | kesê ku li şûna berpirsekî kar dike; cîgir |
| **şûnpê/şûnpêk** | **1.** dewsa piyan a ku li ser axê, heriyê û berfê diyar dibe |
| **şûntilk** | dewsa tiliyan a ku li ser berf, herî û hwd diyar dibe |
| **şûr** | çeka hesinî a ku berê şervanan pê ceng dikir ***"şûr**ê tazî, xwînê dixwaze**"** |
| **şûrbaz** | kesê ku şûran baş bi kar tîne |

| | |
|---|---|
| **şûre** | **1.** barût **2.** pîşo |
| **şûrkêş** | kesê ku jidil û bi awayekî pisporane beravaniyê dike |
| **şûrmasî** | cureyekî masiyên zeryayî ye û nikilê wî dirêj e |
| **şûş** | leclecok |
| **şûşe** | bûjeneke şkestok û zebloq a ku jê camên paceyan û hwd tê çêkirin; abegîne ***“**dil weke **şûşeyê** ye û zû dişkê, lê dereng dicebire**”** |
| **şûşî kirin** | (di zimanê zarokan de) şûştin |
| **şûştin/dişo/bişo** | bi avê paqij kirin *“mêran mêr kuşt, Senemê hûrî **şûşt**” <br> **-bi heft ava hatiye şûştin 1.** pir paqij e û hatiye tehfîrkirin **2.** pir baş e **3.** zelal e <br> **-şûşt ji heriyê avête ser dara diriyê** ji dêla ku kil bike çav derxistin |
| **şût [I]** | şeklekî ku binê wê biber û girover e lê sere wê kêmber û tûj e |
| **şût [II]** | **1.** kone, xasûk **2.** bênamûs |
| **şûtik** | kembera navê |
| **şûv** | şov *“bila şêrê **şûv**ê be, bila ne qopqopê bênderê be**”** |
| **şûv hiştîn** | şov hiştn |

# T

| | |
|---|---|
| **t/T** | tîpa bîst û çaremîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê diranî ye, awayê belavbûna wê girtî û hişk e |
| **ta [I]** | **1.** bend **2.** têla porî ***"ta** bi ta dibe rih**"**<br>**-tayê li dû şûjinê** kesê ku hevsarê kar û barên wî di destê hinekan de ye<br>**-ew tayê tenê ye** piştmêrên wî tunene<br>**-tayekî jê bişkînî sed pine dê jê bikevin** 1. tu dibêjî qerpal êdî riziyane 2. pîneyên kincan bi tayekî bi hev ve sekinîne |
| **ta [II]** | teref, alî<br>**-tayî hev kirin 1.** danîn ber hev  2. rû bi rûyî hev kirin 3. qiyas kirin 4. hevrû kirin ***"**jin dirêse, belê nizane **tayî hev bike"**<br>**-ta girtin** alî girtin |
| **ta [III]** | qat, taq |
| **ta [IV]** | cureyekî nexweşiyê ye  ***"ta,** ji mirinê çêtir e" <br>**-ta lê rabûn** heraret lê rabûn<br>**-lerza tayê**  (ji ber herareta nexweşiyê) awayekî ricafa xeternak e |
| **ta [V]** | hinkuf, deng<br>**-tayê terazûyê** tasikeke te-razûyê<br>**-tayî wî kes tune** dengî wî kes nîn e |
| **ta [VI]** | Heta<br>**-ta roja îroyîn** hetanî vê rojê |
| **ta [VII]** | çiqê darê |
| **tab** | roniya rojê |
| **tabir** | dermanên dijî nexweşiya tayê |
| **tabût** | **1.** darbesta miriyan **2.** qûn, tilor |
| **tac** | pûşiya serê mîran a ku elameta serweriyê ye ***"**aqil **tac**a zêrîn e, li serê her kesî nîn e**"** |
| **taf** | **1.** bela **2.** nexweşî |
| **tafîl/tafîr** | tehfîr |
| **taet** | ibadet, bendetî *"xewa aliman, çêtir e ji **taet**ên sofiyan" |
| **tagir** | terefgir, alîgir |

| | |
|---|---|
| **tagirî** | alîgirî |
| **tagirî kirin** | alîgirî kirin |
| **tahde** | **1.** zulm, sitem **2.** azar<br>**-tahde lê kirin 1.** bi neheqî lê dan **2.** azar lê kirin |
| **tahm** | **1.** seheka ku ziman tê derdixe **2.** çêj ***“**her kes, **tahm**a devê xwe dizane**”** |
| **tahmijîn/ditahmije/bitahmije** | bi çêja tiştekî re kêfxweş bûn |
| **tahmik** | xwarina ku di dafikê de tê danîn |
| **tahm kirin** | **1.** bi zimên tê derxistin **2.** çêja tiştekî nihêrîn |
| **tahmsar** | bêtahm, bêçêj |
| **tahmtîtik** | biçêj, bilezet |
| **tahmûsk** | qelş û qalikdana ku di lêvan de çêdibin |
| **tahmzêr** | avzêr |
| **tajî** | cureyekî heywanên nêçîrê yî sivik û zirav e; dişibihe kûçikan lê pir beza ye ***“**me girt **tajî**, derket toltajî**”** |
| **takekes** | kesayet, ferd, şexs |
| **takekesî** | ferdî, şexsî |
| **tal [I]** | tehl |
| **tal [II]** | vala<br>**-tal kirin** vala kirin |
| **talan** | standina malê xelqê bi darê zorê ***“talan**a mûstangê, livek ceh e**”** |
| **talan kirin** | çopandin ***"**zanîn, nayê **talankirin"**<br>**-talan û tiraş kirin** her tiştê heyî ji binî ve birin |
| **talaz** | toz û xubar |
| **talde** | **1.** cihê ku bîner nabîne, cihê ku tav lê nakeve; qûze 2. berqef ***“talde**yê şêran, ji sitara rûviyan çêtir e**”** |
| **talih** | siûd, bext ***“talih**ê rindan xirab e**”**<br>**-talih çê hatin** kar li hev hatin |
| **talî** | dawî |
| **tal kirin** | vala kirin |
| **tam [I]** | tehm |
| **tam [II]** | **1.** bêqusûr **2.** bêkêmasî |

| | |
|---|---|
| **taman** | fetrûma rehekan |
| **taman kirin** | fetrûm kirin |
| **tamjimare** | jimareyên wekî 1,2,3 û hwd ên ku wekî 1.3, 0.5 û hwd ne şikestî ne |
| **tan** | dîwarê ji qêmîş; kotanî, çît |
| **tana** | Hawarî<br>**-tana hatin** hawarî hatin |
| **tanc** | desthilatî |
| **tang** | **1.** tûş 2. alî ***“**her kes, royê di **tang**a xwe de dibîne**”** |
| **tanût** | tinaze, qerf |
| **tapan** | darê meht ê ku li ser kersengên erdê cotkirî tê gerandin da ku bipelixin û hûr bibin |
| **tapik [I]** | dafik, tele |
| **tapik [II]** | lûtke |
| **tapir** | tivinga nêçîrê |
| **tapî** | penageh |
| **taq** | **1.** dîwar **2.** qat |
| **taqiçk** | dîwarekê nizm ê ku li serê tê rûniştin |
| **taqet** | hêza şiyanê; qudûm, mecal *“dil heye, taqet tuneye” |
| **taqî** | azmûneke ku ji her pirsekê re çend vebijêrk hene û lêbelê ji wan yek tenê bersiva rast e |
| **taqîgeh** | cihê ceribandinên zanistî |
| **taqî kirin** | azmûn kirin |
| **tar [I]** | xîm, hîm, bingeh |
| **tar [II]** | 1. xeleq, xeleqa dorê 2.qawêr, gergere3. amûreke çinînê ye*“palê xerab, das û tarê diguhêre” |
| **-tara bêjingê** | gergereya seradê |
| **tar [III]** | tax |
| **-tara guhê bajêr** | taxa ku ji navenda bajêr dûr e |
| **tar [IV]** | lîs |
| **tar [V]** | şaşik |
| **tar [VI]** | katara stûyî |
| **tar [VII]** | kit |

| | |
|---|---|
| **-tartarî** | kitkitî, belawela |
| **-tar û mar** | belawela |
| **tar [VIII]** | kêf |
| **taraw** | 1. nefy, tehcîr 2. penaberiya mecbûrî |
| **tarawgeh** | 1. cihe sirgûnê; menfa 2.penageha bêgaviyê |
| **tarî** | 1.tîr û girtî, nezelal2. tarîban û neronak*"di tariyê de, çira ro ye" |
| **tarîban** | rewşa bêronahiyê |
| **tarî bûn** | 1. êvar bûn 2. reng girtîtir û tîrtir bûn3.rewşa bînahiya çavan xera bûn |
| **tarîgewrk** | şevereşa pêşîn û paşîn a şevê |
| **tarîgan** | cureyekî zêd e û dişibihe gênim |
| **tarî kirin** | 1.êvar bi ser de anîn 2.reng girtîtir û tîrtir kirin 3.rewşa bînahiya çavan xera kirin |
| **tarîparêz** | dijberê pêşketinê; tedhîşkar |
| **tarîparêzî** | dijberiya pêşketinê; tedhîşkarî |
| **tarîstan** | şevereşa ku hemû deverê radipêçe |
| **tarîtî** | rewşa bêronahiyê û nezelaliyê |
| **tar kirin** | par ve kirin |
| **tarmilandin/ ditarmilîne/bitarmilîne** | qemîçokî/qerçûmekî kirin |
| **tarmilîn/ditarmile/bitarmile** | qermîçokî/ qerçûmekî bûn |
| **tarovaro** | belawela |
| **tarovaro bûn** | ji hev belav bûn |
| **tarovaro kirin** | belawela kirin |
| **tart** | parçeyê ku bi dirêjahî hatiye qutkirin |
| **tartale** | pirtevekirin û standina malê xelqê; oxilme |
| **tas/tasik** | amaneke avê ya hera biçûk e *"tas çingiya, ha rast ha derew" |
| **-tasa sêrî** | tepika seriyî |
| **-tasek ava sar bi ser de vexwarin** | 1. hêvî jê birîn 2. dest jê veşûştin3. ji kîs çûyîn û êdî venegerîn |

| | |
|---|---|
| **taswas** | şaşopaşo |
| **taştê** | xwarina danê sibehê *“taştêdi hênikahiyê de, şîv di ronahiyê de” |
| **tat [I]** | kesê ku di axaftina xwe de dianiqe; lal |
| **tat [II]** | kesê ne ji êlê; pêgirtiyê dereke |
| **tatêl/tatûl** | xema ku ji ber nediyariyê pêk tê; meraq |
| **tatêl ketin** | dil û hinavan ji ber bilaniya karesatekê xemgîn bûn |
| **tav** | 1.gerestêrka rojê 2. roniya rojê *“tav bavê, av diya zeviyan e” |
| **-bi tavê re hatin û bi teyrokê re çûn** | bi derengî bi dest ketin û bi lez ji dest çûn |
| **tavehîv** | heyva çardeşevî; heyveron, nîma |
| **tavgeh** | di bihar û havînan de cihê bêhnvedan û dembihurandinê yî ku tav lê dide û av lê heye |
| **tavgestî** | birîna ku ber tîrêjên tavê maye û hilpingiriye |
| **tavgestî bûn** | (birîn) ber tavê man û werimîn |
| **tavilê** | 1. talîkê 2. wê gavê û bênavber 3.pê re û nişkê ve |
| **tavistan** | havîn |
| **tavî** | barana kêm a ku ne domdar e |
| **tawan** | 1.guneh 2.sûc |
| **-tawanê abûrşikên** | sûc û gunehên ku ji anora mirovî digirin |
| **tawanbar** | 1. kesê ku gunehek lê tê barkirin 2. kesê ku sûcek lê tê barkirin |
| **tawanbar kirin** | 1. guneh lê bar kirin 2.sûc lê bar kirin |
| **tawankar** | 1. gunehkar2.sûcdar |
| **tawan-nasî** | pisporiya awayê pêkhatina sûc û gunehan |
| **tawe** | amaneke malê ya ku tehtevêlkî ye û tê de xurekên zûpij tên pehtin; boçesêlîn, miqilk |
| **tawis** | 1. li cem kurdên berê navê pûtekê tavê ye 2. cureyekî teyrên dîmenxweş û rengîn e*“heçî dîtina tawisî bivê, divê germa Hindistanê jî qebûl bike” |
| **tawî** | kesê ku bi nexweşiya tayê ketiye |
| **tawî bûn** | tûşî nexweşiya tayê hatin |
| **tawûg** | taxûk |

| | |
|---|---|
| **tax** | 1.birek malên gund an jî bajarekî; mehele2. desteya ji heman malbatê |
| **taxim** | desteyeke têkûz |
| **-taximê sîng û beran** | ber û pêsîrên jinan |
| **taxurk** | nasirge, girgirok |
| **taxûk** | alava barkêşiyê ya ku li ser berfê tê şemitandin |
| **taybet** | wesfên ku aîdî yekî tenê ne |
| **taybetî** | 1. xusûsiyet 2. rewişt |
| **-bi taybetî** | nemaze |
| **taybetmend** | xwedanrewişt |
| **taybetmendî** | rewşa kes an jî tiştê ku xwediyê hin wesf û rewiştan e |
| **taye** | 1.toterîk 2.şeyt |
| **taytore** | 1. sersar û bêkêr 2.olintî û yax |
| **taze** | teze |
| **tazî** | 1. rût, uryan 2.xizan *“qûna tazî, tembûrê dixwaze” |
| **tazûg** | taxûk te awayê tewandî yê cînavka /tu/yê |
| **-te dît kanî li ser danî** | warê ku te ecibandiye ne tu war e |
| **teba** | 1. kes an jî tiştê nediyar2. cinawir *“teyr bi per û baskên xwe,teba bi qîl û diranên xwe, mirov bi hiş û fehmên xwe, digihêjin meqseda xwe” |
| **tebane** | derpiyê kurt |
| **tebat** | sebr û sebat |
| **tebatî** | (r) hevoka ku kirdeyê wê ne diyar e |
| **tebat kirin** | sebr kirin |
| **tebax** | Gelawêj *“tebax e, tiriyan raxe” |
| **tebek** | 1. zag2. cureyekî nexweşiya dev û lingên sewalan e |
| **tebeq** | cureyekî nexweşiyê ye |
| **tebeqe** | 1. qat2. tetqal |
| **tebitandin/di tebitîne/ bitebitîne** | 1.aşt kirin, arimandin 2.veterisandin |
| **teber** | tevir |

| | |
|---|---|
| **tebitîn/diteb ite/bitebite** | 1.aşt bûn, arimîn2.veterisîn |
| **tebo** | cureyekî kêzikên ku bi xwîna giyaneweran dijî |
| **tebûr** | şene |
| **tecal** | Decal |
| **-palanê kerê Tecêl** | karê ku naçe sêrî û tim difeşkile |
| **tecrîd** | 1. rûtkirin 2.tenêhiştin |
| **tedhîş** | tirsandin û tehdîdkirin |
| **tedhîşkar** | eşqiya, rêbir |
| **tedhîşkarî** | eşqiyatî, rêbirî |
| **tefandin/dite fîne/bitefîne** | vemirandin, vekuştin |
| **tefîn/ditefe/ bitefe** | vemirîn, vemirîn |
| **tefş** | parçeyê ku di carekî de hatiye birîn |
| **tefşik** | tiştê ku tê de qabiliyeta qutkirinê heye |
| **-diranên tefşik** | diranên ku bi kêrî gestkirin û qutkirinê tên |
| **tefşî** | tefşo |
| **tefşo** | amûreke xeratiyê ya ku bi kêrî birîn û darotina darikan tê |
| **teftî** | şorbeya gênim |
| **tef û tal** | pel û pot |
| **tegel** | şêl |
| **tegel kirin** | şêl kirin |
| **tegere** | egletî, asteng |
| **tehisandin/d itehisîne/bit ehisîne** | 1. dehfandin2. hilisandin |
| **tehisîn/diteh ise/bitehise** | 1. xwe li ser piyan negirtin2. hilisîn |
| **tehîn** | doşava kunciyan |
| **tehjî** | tajî |
| **tehl** | 1.neşirîn 2.tûj  3. biazar *“giyayê hewşê, tehl e” |

| | |
|---|---|
| **tehl bûn** | 1.şirîn nebûn2.(tahm) tûj bûn 3.ji azarekê êşîn *"gayê baş, bi serbaran tehl dibe, mêrê baş bi xereban tehl dibe" |
| **tehlî** | 1. neşirînî, tûjî2. azar û rexne 3. cureyekî çêreya ku binçirka wê tehl e û di dermansaziyê de tê bikaranîn |
| **-tehlî û niç** | gilî, qazinc û rexne |
| **tehl kirin** | 1. şirînahî jê birin 2.tahm tûj kirin3.bi azarekê êşandin |
| **tehn** | gotina tûj |
| **-tehn lê dan** | 1. berî dan2.gotina tûj jê re kirin |
| **tehr** | awa, celeb |
| **tehre** | kelegerma havînê ya dema nîvroyan |
| **teht** | kevirê meht |
| **tehtevêlkî** | rast û tenîsk |
| **-legana tehtevêlkî** | amana xwarinê ya ku zêde ne kûr e |
| **tej [I]** | 1.berik 2.(beriya bi hev ve dirûnê)her parçeyekî kon |
| **tej [II]** | bazar |
| **-tej kirin** | bazar kirin |
| **tejane** | 1. erdê ku her çar aliyên wî bi çiyan ve rapêçandî ne û ava hemû aliyan dikişe na-vendê 2. kana madenan |
| **tek** | bê awarte yek tenê |
| **-tek û tûk** | kêm caran |
| **tekandin/ditekîne/bitekîne** | 1. çelqandin 2. hejandin |
| **tekane** | yekane |
| **tekbîr** | gotina "Allahu Ekber!"ê |
| **-tekbîr anîn** | "Allahu Ekber!" gotin |
| **teketek** | yek bi yek, yekoyeko |
| **tel [I]** | xwar |
| **-tel kirin** | xwar kirin |
| **-kumê xwe tel bigire!** | kêfxweş be! |
| **tel [II]** | careke lêxistina bi qiloçan |

| | |
|---|---|
| **-bi telan hatin hev** | (sewal)bi qiloçan êrîşî hev kirin |
| **tel [III]** | careke lêxistina bi şiva holetelê |
| **-telê xwe xwarin** | 1.dora lêxistina xwe temam kirin 2.pel xwarin, gon xwarin |
| **telan** | parçeyek erd |
| **telandin/ditelîne/bitelîne** | 1. aşt kirin 2. xew re kirin |
| **-xwe lê telandin** | 1. dizîka li yekî payîn 2. dizîka ji yekî re kemîn danîn |
| **telar** | 1. koçk 2.balexane |
| **telaş** | 1. kelefeyê tayî 2. arekê ku ber darên qutkirî dimîne; talaz |
| **telaşe** | coşiya ku bi xwe re şaşwaziyê tîne |
| **tele** | 1. rastahiya ku di nav xilxileyê keviran de ye û li cihekê asê ye 2. dafik, kemîn |
| **-ketin teleyê** | ketin kemînê |
| **telebkar** | deynxwaz |
| **telef bûn** | dêrz bûn |
| **telef kirin** | dêrz kirin |
| **telemişk** | dafika mişkan |
| **teletel** | dizîka û veşartî |
| **-teletel payîn** | dizîka û veşartî raçav kirin |
| **telew** | dêlese, dêlegur û mahû û ajalên din ên ku dema gonxwarina wan hatiye |
| **telew bûn** | ketin dema gonxwarinê û lê sor bûn |
| **telêz** | yom, pêpal |
| **telikîn/ditelike/bitelike** | terikîn, (heywanên wekî dêlese, dêlegur û mahûyê)têjik anîn |
| **teliqîn/diteliqe/biteliqe** | telikîn |
| **telîs** | derdaneke ku ji bardanî biçûktir e |
| **telp [I]** | 1. komeke ewran2. refeke çivîkan |
| **telp [II]** | xwî |
| **-telpinan baş e** | hin xwiyên wî yên baş jî hene |
| **telptelpî** | xwediyê kesayeta guherbar |

| | |
|---|---|
| **telwe** | dûrda ku di binê pingana qehweyê de dimîne |
| **tem [I]** | mij |
| **tem [II]** | mija ku di nav stêrkan de xuya dibe |
| **tem [III]** | niyêt |
| **-tem kirin** | niyêt kirin |
| **temam** | kemilî |
| **temam bûn** | kemilîn |
| **temam kiri** | kemilandin |
| **temar** | 1. giraniya xewê 2. xewa giran |
| **temartin/ditemêre/bitemêre** | 1. çal kirin, binax kirin 2.bincil kirin, serpeçûm kirin 3.agir vemirandin |
| **temartî** | 1. veşartî 2. vemirî |
| **temaşe** | 1.raçavî 2.nihêrîn *"temaşe, ji mêwijan xweştir e" |
| **-temaşe li paş e** | ev hê lolo ye û lêlê li pey re tê |
| **-lê temaşe kirin** | lê mêyzenandin, lê nihêrîn |
| **temaşekar** | bîner |
| **temaşevan** | bîner |
| **temawî** | mijawî |
| **tembekî** | titûna kokosê |
| **temberî** | tûncik, çûncik |
| **tembûr** | cureyekî amûrên mûsîqayî ye |
| **tembûrvan** | pisporê jenîna alava tembûrê |
| **teme** | 1. tenbîh, hişyarî 2. şîret |
| **-temeya min li te** | bila şîreta min di guhên te be |
| **-temiya bavan** | şîretên ku pêşiyan li me kirine |
| **teme kirin** | daxwaz kirin |
| **temel** | mal û milk |
| **temen** | salên jiyan an jî hebûnê |

| | |
|---|---|
| **temendirêj** | kes an jî tiştê ku gelek salan jiyaye |
| **temendirêj bûn** | gelekî jiyan temendirêjî rewşa kes an jî tiştê ku gelek salan jiyaye |
| **temenkurt** | kes an jî tiştê ku hindik salan jiyaye |
| **temenkurt bûn** | hindikekî jiyan |
| **temenkurtî** | rewşa kes an jî tiştê ku hindik salan jiyaye |
| **temerî** | porê ku dadikeve ser eniyê; tûncik |
| **temezî** | mêzereke rengrengî ya ku li dora kofiyan tê alandin |
| **temirandin/ditemirîne/bi temirîne** | tefandin |
| **temirîn/ditemire/bitemiretefîn** | , vemirîn |
| **temz** | karê pevekirina hesinên şikestî; lehîm, kewandin |
| **temizandin/ditemizîne/bitemizîne** | (hesinên şi- kestî bi hev ve)lehîm kirin, kewandin |
| **ten** | tiştê ku cihekî digire û giraniyeke wî heye; laş |
| **tena** | 1. rehet û aram 2. hêmin 3.aşt û negiriyayî |
| **tenaf** | şirît, weris |
| **tenafbaz** | kesê ku li ser şirît û werisan dilîze |
| **tenahî** | 1.aramî 2.hêminî2.aştî |
| **tenbel** | teral |
| **tenbel bûn** | teral bûn |
| **tenbelî** | teralî |
| **tenbû** | cureyekî heşeratan e; gen |
| **tendurist** | kes an jî tiştê ku tu nexweşiyeke wî tune ye; bisihet, bijûn |
| **tenduristî** | temtêla bênexweşiyê û xurtiya bedenî; jûn, sihet |
| **tenduristînasî** | zanistên ku pisporiya wan têkildarî jûnê ye |
| **tendûr** | 1. cihê ku tê de nan tê pehtin 2.sîtila ku di navgînên raguhastinê ên kevn de ardû diavêtinê *“zavayê li ser xezûran, seyê li ber tendûran“ |

| | |
|---|---|
| **teneke** | 1. hesinê qelakirî2. debe, kod 3. navê giştî yê hemû amanên ji tenekeyî |
| **tenê** | 1. bi serê xwe2.livek/hebek |
| **teng [I]** | 1. nefireh 2.şidiyayî 3.kêmber *“mêrê çê di roja teng de tê fêmkirin” |
| **teng [II]** | 1. qûşa zînê hespan2. werisê ku pê bar tên şidandin |
| **tengal** | parxan, newq |
| **tengasî** | 1.destengî 2.xizanî 3.sergêjî |
| **tengav** | 1.bêzar 2.bêhnçikiyayî *"zivistan,tengava mirinê ye” |
| **tengav bûn** | 1. bêzar bûn2.bizdîn 3.aciz bûn |
| **tengav kirin** | 1.bêzar kirin 2.bizdandin 3.aciz kirin |
| **tengayî** | 1. nefirehî 2.xizanî 3.xela 4.canbêzarî5.tengasî *“piştî tengayiyê, firehî tê” |
| **tengbîn** | kesê ku tiştan di qadeke kêmber de difikire û dinirxîne; bedbîn |
| **teng bûn** | 1. ji firehiyê çendek daketin 2.kêmber bûn 3.şidîn |
| **tengerê** | 1. şiverê 2.riya berteng |
| **tengezar** | bêhal, bêmecal |
| **tengezar bûn** | 1. betilîn2.hetikîn |
| **tengezarî** | 1. bêhalî, bêmecalî 2.tengasî |
| **tengezar kirin** | 1.betilandin 2.hetikandin |
| **tengijandin/ditengijîne/bitengijîne** | 1. dev lê tehl kirin 2. bihêrs kirin |
| **tengijîn/ditengije/bitengije** | 1. di navê de man 2. rik hatin, bihêrs bûn |
| **teng kirin** | 1. ji firehiyê çendek daxistin 2. şidandin3. kêmber kirin |
| **tenik** | zirav û nazik |
| **tenik bûn** | zirav û nazik bûn |
| **tenikî** | ziravî û naziktî |
| **-tenikiya rêvebiriyê** | gerandina kar û barên îdarî bi awayekî dûrî nepenî û derzagoniyê |
| **tenik kirin** | zirav û nazik kirin |
| **tenişder** | çarçiveya dêrî; rûderî |
| **tenişt** | kêlek, tehêl |

| | |
|---|---|
| **tenî** | reşahiya ku ji ber dû û duxanê li binê feraqan ve çêdibe *“filan kes zaca Helebê ye, teniya bi don e” |
| **-tenî girtin** | (ji ber dû) hîsê pê ve girtin |
| **-tenî kirin** | riswa kirin |
| **tenîper** | rûpeleke rengîn a ku dikine nava du kaxezan da ku heman nivîsê derbasî ya li binî jî bike |
| **tenûr** | tendûr *“tenûr, nesincire, nên napêje” |
| **tenza kirin** | leva kirin, belav kirin |
| **tep [I]** | dek û dolab |
| **tep [II]** | şeqam, sîle |
| **-tepek û du tep lê xistin** | çend şeqam avêtin yekî |
| **tep [III]** | kêrt, gir |
| **-tepê li pêşberî gundî** | girê/ kêrtê li pêşpala gundî |
| **tep [IV]** | rûxan |
| **-tep bûn** | rûxîn |
| **-tep kirin** | rûxandin |
| **-bi ser de tep kirin** | bi ser de hilweşandin |
| **teparik** | parçeyê ku pê tiştên devteng tên girtin |
| **tepedor** | dervankê darîn ê ku pê devê amanên devteng tê girtin |
| **tepeserî** | zulm, sitem, zordestî |
| **tepeser kirin** | tahde lê kirin |
| **tepik** | 1. gilfika herî û rêxê2. kermeyên ku bi dest tên çêkirin |
| **tepil** | cureyekî amûrên mûsîqayî ye |
| **tepink** | teqemeniya ku di bin erdê de tê bi cih kirin û gava giranî têkeve serê diteqe |
| **tepisandin/ditepisîne/ bitepisîne** | 1. (bi awayekî kîp) dagirtin 2. tahde lê kirin 3. ritimandin |
| **tepisîn/ditepise/bitepise** | 1. (bi awayekî kîp) tijî bûn 2. tûşî tahdeyê hatin3. ritimîn |
| **tepiş** | qabiliyet |

| | |
|---|---|
| **teplû** | nexweşiyek e |
| **tepres** | dekbaz, fendbaz |
| **teqal** | girover, tehtevêlkî |
| **teqandin/diteqîne/biteqîne** | 1. gule berdan2.behicandin 3.bi teqemeniyê belawela kirin |
| **teqel** | di xalbendiyê de nîşaneya bendikê |
| **teqemenî** | bûjenên wekî gule û barûtê yên ku diteqin |
| **teqereq** | 1. dengê teqîna teqemeniyê 2. teperep*“teqereqa feraqan, şeqeşeqa pereyan, fîqefîqa jinan, fireh dike dilan” |
| **-teqereqa ji bo dinyayê** | kudandina ji bo domana jiyanê |
| **teqez** | 1. miheqeq, mitleq2.lezgînî |
| **teqil** | giranî |
| **teqilandin/diteqilîne/biteqilîne** | 1. giraniya tiştekî pîvan 2.hejandin |
| **teqin** | herî |
| **teqinandin/diteqinîne/biteqinîne** | di heriyê de gut kirin û çikilandin |
| **teqinîn/diteqine/biteqinedi** | heriyê de gut bûn û çikilîn |
| **teqizandin/diteqizîne/biteqizîne** | pengizandin |
| **teqizîn/diteqize/biteqize** | pengizîn |
| **teqîn/diteqe/biteqe** | 1. bandora teqemeniyê xuya bûn 2.dengê teqemeniyê hatin, gurmîn |
| **teqle** | qulopanî |
| **-teqle avêtin** | 1. qulopanî kirin 2. xwe gêr kirin |
| **teqlîd** | cure |
| **teqlîde** | sexte |

| | |
|---|---|
| **teqoze** | 1.xerabe 2.geveze 3.feramûşbûyî *“aşê teqoze, arvên nahêre” |
| **teqteqoşk** | 1. demançe2. demançeyên zarokan |
| **ter** | 1.çêre û dara şil a ku hişk nebûye 2.neceribandî 3.nûgihiştî *“bi qîzan re neçin, qîz ter in; bi jinebiyan re neçin, zehf digerin” |
| **-ter kirin** | giya û darik bi avê nerm kirin |
| **-ter û can** | ciwan |
| **-ter û hişk tev şewitîn** | heq û neheq gişt tûşî bobelatekê hatin |
| **tera bûn** | ji jorê ber bi jêrê ketin |
| **terad** | pêşbirk |
| **teraf** | elametên beriya xwêdanê |
| **-terafên xwêdanê** | germahî û şilahiya ku beriya xwêdanê di lêş de pêk tên |
| **teraf kirin** | rûçikandin |
| **terahî** | rewşa hêşînbûna çêre û daran |
| **teral** | 1.selexane, lexer 2. kêmxebat 3. fizirok*“bibêjin lal e, mebêjin teral e” |
| **teralî** | 1.selexanetî, lexerî2.kêmxebatî 3.fiziroktî |
| **terandin/diterîne/biterîne** | qewirandin |
| **terane** | 1. tinaze, qerf 2. henek |
| **teraqî** | aviyeke şirîn a ku mêş ji kulîlkên curecureyî tînin û pê hingivî çêdikin |
| **teraş kirin** | 1. darijtin2. kurtisandin |
| **teratin** | çûn û hatin |
| **-riya teratinê** | riya çûn û hatinê |
| **terawil** | dirinde |
| **teraz** | hevseng |
| **terazîn** | 1. hevraz 2. berpal |
| **terazû** | amûreke pîvandinê ya ku ji du çaviyan pêk tê û di çaviyekî de mengiranî û a din de jî giranî tê danîn; mêzîn |
| **terazûn** | 1. hêza dûgelê ya aborî 2. pêşniyara ku derhat û mezaxtinê bi awayekî hûrgilî û ji bo demeke kifşkirî nîşan dide |
| **ter bûn** | (dar û giya)di avê de nerm bûn |
| **ter kirin** | (dar û giya) di avê de nerm kirin |

| | |
|---|---|
| **tere û tûre** | axaftina beletewş û berevajî |
| **teremast** | mastê ku di parzûnekî de hatiye dawerivandin û ji bo zivistanê hatiye parastin |
| **tereng** | rengê tarî |
| **tereqe** | dûvçika fîşenga teqiyayî |
| **tereqî** | cureyekî xoxan e |
| **teres** | qewad, qebrax *"teresê dinyayê, mal bar kir û bir ba mala bavê jinê" |
| **teresî** | qewadî, qebraxî *" teresî, ne karê mêran e" |
| **terez** | zîpik |
| **terg** | gijloka gir |
| **terk** | valahiya di navbera pîneyê pêçandî; qelş |
| **-terka zikê kengerê** | bêrîka ku bi zikê kengerê ve ye û têjika xwe dikê |
| **-pere kirin terka şaşikê** | dirav di nav qatên şaşikê de veşartin |
| **terifandin/di terifîne/ biterifîne** | 1.(çav) êşandin 2.dariştin, teraş kirin |
| **terik** | 1. êzingê ter2. şiva mezin3. mûzî |
| **terikandin/di terikîne/ biterikîne** | 1.hiştin 2.jê vegerîn 3.dest jê şûştin, dev jê berdan |
| **terikîn/diteri ke/biterike [I]** | telikîn |
| **terikîn [I]** | 1. pir girs 2. pir fireh 3. pir giran |
| **terixandin/di terixîne/ biterixîne** | (mêwe) bi emadê wan stewandin |
| **terixîn/diteri xe/biterixe** | (mêwe)bi emadê xwe stewîn |
| **terî** | boç, dêl, dûv |
| **-terî lê badan** | bêhn lê çikandin |
| **-teriya xwe kirin nav şeqa xwe** | ji tirsan dengê xwe nekirin û bêxîretî qebûl kirin |

| | |
|---|---|
| **terîj** | pîneyê kêmber û dirêj |
| **terîjk** | pîneyê kêmber û dirêj ê ku pê birînan girêdidin |
| **terk [I]** | destvekişandina ji tiştekî û li ser halê wî hiştin |
| **-terk kirin** | terikandin |
| **terk [II]** | derz, cerx, qelş |
| **-terk lê ketin** | derz lê ketin |
| **terke** | çiqilê ziravik |
| **terkî** | 1. siwarbûna li pişt yekî 2. maweya di navbera zîn û hêtên lêsiwariyê |
| **-avêtin terkiya xwe** | 1. kesek li pişt xwe siwar kirin 2. tiştek li pişt zîn ve girêdan 3. selikek bi keleyê erebeyê ve girêdan |
| **terkedinya** | 1. munzewî2.ji bayê dinyayê bêhay |
| **terkeser** | beredayî, bêwar |
| **terkîb** | peyvebend |
| **terlan** | xortê bedew î çeleng |
| **term** | 1.cesed, laş 2.kelax3. komeke stêrkan e |
| **-termê Merxê** | komstêra ku bi heft stêrên xwe ve weke çoçikê ye |
| **-termê Adem** | komstêra ku Termê Merxê biçûktir e |
| **terme** | di bihar û havînan de cihê rûniştinê yî ber derê malê; hewş |
| **terpeterp** | dengê meşîna giyaneweran û avêtina dilî |
| **terpilandin/diterpilîne/biterpilîne** | şewişandin |
| **terpilîn/diterpile/biterpile** | 1.tehisîn, şimitîn2.milmilîn, weşweşîn |
| **terpîn/diterpe/biterpe** | dilê zindî bi terpeterp avêtin |
| **terpûş** | 1. şara serê jinan; mêzer 2.kes an jî tiştê ku spehî xuya dike |
| **terq** | tiştên sertûj ên wekî hesin, dar, ber û hwd |
| **terqandin/diterqîne/biterqîne** | 1. ji hev belawela kirin 2.tarovaro kirin3. behicandin û çewisandin |
| **terqîn/diterqe/biterqe**1 | . ji hev belawela bûn 2. tarovaro bûn 3. behicîn û çewisîn |

| | |
|---|---|
| **ters [I]** | 1. çewt2. berevajî3. peşk, pêxem |
| **ters [II]** | gemara ker û hespan |
| **tersî** | 1. çewtî 2. berevajîtî3. pêxemî |
| **terskul** | ters |
| **terş [I]** | cendek, mirar |
| **terş [II]** | 1. hemû sewalên kedîkirî 2.nexweşiyeke sewalan e 3. sewalên talankirî |
| **terş [III]** | dêw, tewa, ûc |
| **tertepêl** | gotegot, pizepiz |
| **tertilîn/diter tile/bitertile** | 1.ji hev veqetîn 2. pelate bûn 3.tarovaro bûn |
| **terwende** | tiştê ku her car pêk nayê; degme |
| **terx** | bêqusûr, bêeyb |
| **terxan kirin** | 1. veqetandin 2.jê re mezaxtin 3. diyarî kirin |
| **-terazûna terxankirî** | budceya ku ji karekî taybet re hatiye veqetandin |
| **terxîs** | ruxset, destûr |
| **-terxîs bûn** | (leşkerê bêpaye yê ku perwerdeya cengê dîtiye)vegerîn malê |
| **-terxîs dan** | destûr dan |
| **-terxîs kirin** | (leşkerê bêpaye yê ku perwerdeya cengê dîtiye)şandin malê |
| **terye** | heramî, diz |
| **terz** | awa, usûl |
| **terzî** | kincdirû |
| **teselî** | 1. pirsîna li rewşa yekî/tiştekî2. qilalî |
| **teselî kirin** | 1. li rewşa yekî/tiştekî pirsîn 2. kesek/tiştek payîn û ji rewşa wî agehdar bûn |
| **tesîr** | bandor, eser |
| **tesk [I]** | kêmber |
| **tesk [II]** | hemaset, xwîngermî |
| **teslîm** | radest |
| **teslîm kirin** | radest kirin |
| **-teslîmî Xwedê kirin** | 1. emanetî Xwedê kirin 2. neheqiya ku lê hatiye kirin erzehalî ba Xwedê kirin |
| **teşe** | awa, tehr, dirûv |

| | |
|---|---|
| **-teşe girtin** | 1.dirûv girtin2.di qalibekî de ro bûn |
| **teşim** | di bajêr de riya binerdî ya ku ji bo vederkirina ava gemar hatiye vekolan |
| **teşî** | alava ku pê rîs tê ristin *“keç teşiya diya xwe radike, law tîra bavê” |
| **teşk** | ji aliyê piştê ve geha lingan |
| **teşq** | bandora sermayê |
| **teşqele** | 1. xiroşî2. pêxemî 3. bela |
| **-ketin teşqeleyê** | 1. ketin bela û heyteholê2. ketin heys û beysê |
| **-teşqele derxistin** | 1. arîşe derxistin2. bûn sedema lecê û devjeniyê |
| **teşt** | 1.amana ku kinc an jî feraqên malê tê de têne şûştin 2. amana ku hevîr tê de tê stran |
| **teşwîq** | 1. niç û navtêdan2. piştgirî |
| **teşwîq kirin** | 1. niçandin yekî û nav tê dan2. piştgirî dan yekî/karekî |
| **tet/tetik** | (di zimanê zarokan de) dest/destik |
| **teter** | pîlik |
| **tetirxan** | nexweşiya ji ber xwarineke jehrîn, afnikî an jî xirabûyî |
| **tetirxanî** | kesê ku xwarinekê jê girtiye |
| **-tetirxanî kirin** | ji qehran behicandin |
| **tev** | gişt, hemû *“axa riyan tev dizane, lê riya qenciyên gel nizane” |
| **-bi tevayî** | 1.bi giştî 2.hemû tê de |
| **-tevî tiştekî** | pê re, ligel*“hespê çê, tevîqeyd û merbenda xwe diçe şerî” |
| **tevayî** | bi hevre |
| **tev dan** | 1.bi hev dan 2. tev li hev kirin 3.bi ser hev xistin |
| **tevdêr** | alava ku pê mêwe tên guvaştin û ava wan tê derxistin |
| **tevdîr** | 1. tedbîr 2.semt3. hişmendî *“ava bîran bi tevdîran” |
| **tevdêr** | amûra ku pê tişt tên tevdan |
| **tevger** | 1. bizav, hereket2.temtêl *“ava golan bê tevger e” |
| **tev gerîn** | livîn û hereket kirin |
| **tevir** | alava erdkolanê; koling *“însanê bêesas, ne dibe tevir ne dibe das” |
| **tevir kirin** | 1.pêmer kirin, mer kirin 2.vekolan |

| | |
|---|---|
| **tevizandin/ditevizîne/ bitevizîne** | (laş) bi derba sext an jî bi dermên bêtevger kirin |
| **tevizîn/ditevize/bitevize** | 1.wekî bêruh bûn, wekî can jê kişîn 2.ji ber bandora dermên we-kî bêruh bûn 3.(hin sewal di zivistanan de) ketin xeweke giran |
| **tevkar** | alîkar |
| **tevkarî** | 1. hevparî 2.hevalbendî 3.beşdarî |
| **tevkujî** | qetliyam |
| **tev lê bûn** | 1.bi ser ve bûn2.pê ve bûn 3.tê de bûn, beşdar bûn |
| **tev lê kirin** | 1.bi ser ve kirin 2.pê ve kirin 3.tê de kirin |
| **tevlihev** | 1.bi ser hev de2.têvel |
| **tev li hev bûn** | ketin nava hev |
| **tev li hev kirin** | berdan ser hev |
| **tevn** | dezgehê raçandina berik, xalîçe, xurcik û hwd *"tevnku li dar ket, êdî li erdê namîne" |
| **tevnepîr** | tora ku pîrhevok radiçînin |
| **tevnî** | her du darên ku firêta tevnê lê dialînin |
| **tevş** | kevirê meht ê bi qasî destekî |
| **tevşo** | tefşo |
| **tevtal** | kel û mel |
| **tevtevîk** | alaveke mûsîqayê ye |
| **tevz [I]** | terane, laqirdî |
| **tevz [II]** | rewşa wekî bêgiyanbûnê ya endamên giyaneweran |
| **-tevz dan xwe** | xwe vepezinandin |
| **tevzî** | di dema tirs an jî ricafê de jana ku di rehên cendêk de peyde dibin |
| **tew** | qe, qet, hîç |
| **-tew tew!** | peh peh!, hey lo lo! |
| **tewa** | teba |
| **tewal** | balinde |
| **tewan** | tiwanî |

| | |
|---|---|
| **tewandin/ditewîne/bitewîne** | 1.xwar kirin 2. çemandin |
| **tewandî** | 1. xwarkirî 2. çemandî*“serê virekan, tim tewandî ye” |
| **tewang** | (r) ji ber hin egerên rêzimanî guherbariya di peyvan de |
| **tewaş** | rûn, zêt |
| **tewek** | nexweşiya kulbûna dev û piyên sewalan |
| **tewekor** | kesê ku dinêre lêbelê nabîne |
| **tewere** | mihwer, guzargeh |
| **-tewereya cîhanê** | mihwer û guzargeha dinyayê ya ku tê de dizivire |
| **tewişandin/ditewişîne/bitewişîne** | 1.(da ku bi serbestî têkiliya zayendî dayne) sewalê nêr berdan nav sewalên mê 2. weşweşandin, milmilandin |
| **tewişî** | sewalê ku bûye mubtelayê têkiliya zayendî |
| **tewişîn/ditewişe/bitewişe** | 1.(heywanê nêr) hînî têkiliya zayendî bûn2.weşweşîn, milmilîn |
| **tewiz** | xeml |
| **tewizandin/ditewizîne/bitewizîne [I]** | 1.xemilandin, çîç kirin 2.araste kirin 3.ser û sîçeyê xwe têkûz kirin |
| **tewizandin/ditewizîne/bitewizîne [II]** | têk birin, teqoze kirin |
| **têhnşîrî** | şîregerm, hênik |
| **têjik** | sewala nûzayî *“têjikên maran jî, bijahr in” |
| **--têjika sala xelayê** | pir birçî û çavçil |
| **-têjik anîn/derxistin/kirin** | 1. (sewala çarpê) zayîn 2. (balinde) cûcik derxistin |
| **têkber** | 1. raxistekên nava malê 2. kel û mel, pilî û pirtî |
| **-têkberên malê** | raxistek, rûniştek û arastekên malê |

| | |
|---|---|
| **têk birin** | 1. bi bin xistin2. mexlûb kirin 3. bêbandor kirin |
| **têk çûn** | 1. bi bin ketin 2. tarovaro bûn 3. hilweşîn |
| **têk dan** | 1. nav tê dan 2. teşwîq kirin 3. niçandin |
| **têkel** | 1. tevlihevî 2. serhevde3. têvel û rengrengî |
| **têkel kirin** | tev li hev kirin |
| **têketin [I]** | cihê ketin û derbasbûnê yî li hundir; dergeh |
| **-mişeya têketinê** | diravê ku ji bo temaşekirina şanoyekê, gera di nav perûkxaneyekê û hwd tê dayin |
| **têketin [II]** | di malperê de bişkoka derbazî naveroka malperê dike |
| **têkilî** | eleqe |
| **-tekilî danîn** | eleqedar bûn |
| **têkildar** | eleqedar |
| **têkoşer** | 1. şervan 2. berxwedêr |
| **têkoşîn/têdikoşe/têbikoşe** | 1. lê banîn 2. pê re mucadele kirin, ber xwe dan |
| **têkûz** | bêkêmasî û berkemal |
| **têl** | bendê ku ji madenên wekî hesin, mîs û hwd tê çêkirin û piranî di amanên nûjen de wekî raguhêza gêrebayî tê biakaranîn |
| **têlbend** | tiştê ku bi têlê hatiye girêdan |
| **têldirk** | têlên ku pê ve strî û dirik hene û pê dora cihên qedexe tê rapêçan; sîme |
| **-têldirk kirin** | sîme kirin |
| **têlmaş/têrmaş** | kes/tiştê ku hatiye terikandin |
| **têneper** | negerguhêz |
| **têper** | gerguhêz |
| **têr [I]** | (da ku bavêjin ser pişta sewalên barkêş) du telîsên ku aliyekî wan bi hev ve hatiye dirûtin |
| **têr [II]** | giyanewerê ku pêdiviya wî bi xwarinê tuneye; nebirçî, ziktijî |
| **-têr û tesel** | mişt tijî |
| **-têra tiştekî/yekî** | bi qasî ku pêwist dike *“ez he me û têra te me” |
| **têrawis** | çinîna dereng |
| **têr bûn** | ziktijî bûn *“kesê ku ji teşta xwe têr nebe, li mala xelqê qet têr nabe” |

| | |
|---|---|
| **tê re kirin** | 1. tê de çikilandin2. tê de gut kirin 3. tê re derbas kirin |
| **têrê kirin** | 1. bi qasî pêdiviyê |
| **tev gerîn** | 2. besî tiştekî kirin *“hezar dost kêm in, dijminek têrê dike” |
| **têrik** | têra biçûk |
| **têr kirin** | 1. (zik) tijî kirin2. dagirtin *“biharê xwe |
| **têr meke** | , payizê xwe bi derengiyê mexe” |
| **têrmal** | dewlemend, sermiyandar |
| **têrnexur** | hûrtirş, çavbirçî |
| **têr xwarin** | 1. (zik) tijî kirin2. bi emade xwe xwarin*“têrxwarin tune ye, lê belê danîn adet e” |
| **têvel** | curecureyî |
| **tê werdan** | 1. kilîn, kiyan2. bi avê şûştin |
| **tê xistin** | 1. tê de danîn 2. bi cih kirin |
| **têz** | barûd |
| **tibab** | miqdar |
| **tif** | şileya devê giyaneweran; tûk |
| **tifal** | 1. zarok 2. ecemî, nûgihiştî |
| **tifaq** | yekîtî *“tifaqa mûstangan, çiyan jî qulqulî dike” |
| **tifik** | 1. kuleka bixêriyê; kufik 2. nepaxa hesingeran |
| **tifing** | çeka lûledirêj a bi dûvçik *“gotine: ‘dîno tifing çi ye? gotiye: ‘dev dirêj e, qûn qirêj e, dest davêjêyî ber davêje” |
| **tifingendazî** | meşqa guleberdanê |
| **tif kirin** | tûka devê xwe reşandin |
| **tifre** | paye, rade |
| **tift** | çêjeke ku di navbera şirînî û tirşiyê de ye; meyxweş |
| **tihok** | cureyekî daran e |
| **tihtavik** | pûng |
| **tijî** | 1. ne vala 2. bi dêv rê qûç |
| **-mişt tijî** | 1. bi dêv re qûç2. heta dêv dagirtî |
| **tijî bûn** | (heta dêv) dagirtî bûn |
| **tijî kirin** | (heta dêv) dagirtin |
| **tik** | cihê dirûnê; kêl |

| | |
|---|---|
| **tika** | 1. lavayî 2. rica |
| **tika kirin** | 1. lavayî kirin2. rica kirin |
| **til** | navik |
| **-tilî alastin** | hin sudên biçûk bi dest xistin |
| **tilik** | 1. girik 2. kome |
| **tiling** | dêl |
| **tilî** | pêçî *“avan da serî, çi bihustek çi çar tilî” |
| **tilîlî** | bangdaneke jinan a di şahiyan de ye |
| **-tilîlî avêtin** | (jin) di şahiyan de bang dan |
| **tilm** | mengiraniyeke pîvandina zêd e û bi qasî 23 kîloyan e |
| **tilor** | qûn, tabût |
| **tilove** | mişt tijî |
| **-gotina te ji çewtiyan tilove** | ye axaftina tijî şaşî ye |
| **tilp** | torte/dûrd, xilt |
| **tilpekî bûn** | piyên lingan ketin ber hev û nêzîkî ketinê bûn |
| **tilûr** | cureyekî çivîkan e |
| **tilx** | xilt, malêz |
| **tilyak** | bûjenên wekî esrar û şîrê xaşxaşikan ên ku serxweşiyê pêk tînin û lêş ditevizînin |
| **tilyak-kêş** | esrarkêş, xaşxaşî |
| **tilyakfiroş** | esrarfiroş |
| **tim** | her wisa, daîmî |
| **tima/timakar** | bexîl, çiriz, çikûs *“merivê tima, malê xwe naxwe” |
| **timahî/timakarî** | bexîlî, çirizî, çikûsî *“timahî, tim kêmahî ye” |
| **tinaze** | qerf, terane |
| **-tinaze pê kirin** | terane pê kirin, qerf lê kirin, henekê xwe pê kirin |
| **tinazwer** | qerfok, henekbaz |
| **tingîn/ditinge/bitinge** | ringîn, ringering kirin |

| | |
|---|---|
| **tingînî** | dengê ringeringê |
| **tiptenê** | bi serê xwe û kesek ne li hindê |
| **-tir [I]** | paşgireke ku di hevalnavan de payeya hevrûkirinê diyar dike; mînak: mezin+tir |
| **tir [II]** | bayekê bidengê ku ji tilora giyaneweran dertê *“çû ber tira golikan” |
| **-tir kirin** | 1. bayê bi deng ber çûn 2. feşilîn *“derpiyê min li xwe ke, lê tê de tir û fisan meke” |
| **tirad [I]** | 1. pêşbirk 2. merc |
| **tirad [II]** | pergîhatina du aliyên gogbaz |
| **tiraf** | ariya ku hîna agir tê de heye |
| **tirampe** | teqes û tûqes, pevguherandin |
| **tirampe kirin** | teqes û tûqes kirin, bi hev guherandin |
| **tiran** | tasika avê ya mîsîn |
| **tirb** | 1. gor, mezel 2. ziyaret |
| **tirbistan** | goristan |
| **tirec** | pêlekan |
| **tirek** | 1. kesê ku deng li ber qûnê dikeve 2. bêkêr*“tirek û du tir, li cem tirekan weke hev in” |
| **tirimbêl** | erebe, seyare |
| **tirî** | cureyekî mêweyan e*“heke mirov ji rezekî tiriyek xwaribe, nabe ku mirov pişta xwe bidê” |
| **-tirîn** | paşgireke ku di hevalnavan de payeya berztirîn diyar dike; mînak:xweş+tirîn=herî/ tewrî xweş |
| **tirîş** | sedem, bone |
| **tirs** | xof, saw, sehm *“diya dizan du tiran dike, yekê ji kêfan yekê ji tirsan” |
| **tirsandin/ditirsîne/bitirsîne** | 1. sehm lê firandin2. diran jê re çirikandin |
| **tirsîn/ditirse/bitirse** | 1. jê saw girtin, jê sehm girtin 2. newêrîn *“kerê mirî, ji gur natirse” |
| **tirsnak** | bixetere, bitalûke |
| **tirsonek** | 1. newêrek 2. bizdonek *“dilê tirsonek, sînga gewr nabîne” |
| **tirş** | 1. şor, tahmşor 2. helîseya bacanên sor*“kesek nabêjê: ‘dewê min tirş e’ ” |
| **tirş bûn** | 1. şor bûn 2. (hevîr) xirab bûn û nehatin pehtin 3. (mast) ji bo kiyanê çêtir bûn |
| **tirşî** | şorî |

| | |
|---|---|
| **tirşik** | xurekê ku ji sewzeyên curecureyî tê çêkirin |
| **tirşîn** | xwarina ku ji sewzeyên şoravkirî pêk tê |
| **tirş kirin** | şor kirin |
| **tirtire** | geltegan, şelegan |
| **tirtûl** | cureyekî kurmikan e |
| **-tirtûl ketin ber/tirtûlê kulê pê girtin** | ji bo xwarinekê can avêtin, kumişîn ser û pirteve kirin |
| **tirnefesî** | (ji ber bêhna tir û fisan) neksçikîn |
| **tirnefesî bûn** | (ji ber bêhna tir û fisan) neks çikîn û bêhnteng bûn |
| **tirnefesî kirin** | (ji ber bêhna tir û fisan) neks lê çikandin |
| **tirxes** | kesê ku wekî xesandiyan nikare tûşî jina xwe bibe |
| **tirxesî bûn** | (di têkilîdanîna zayendî de) nivîşkan bûn |
| **tisî** | 1. xalî 2. bêîlawe |
| **tişt** | heyber *"tiştê ku çû, mede dû" |
| **tiştîr** | bizina dusale ya beravis |
| **tiştonek** | pirsa biraz |
| **titqal** | 1. qalik 2. qalikên qat bi qat ser hev |
| **-titqal girtin** | li serê tebeqeyeke ji qalikan çêbûn |
| **titqaltitqalî** | tiştê ku qat bi qat qalik girtiye |
| **titûn** | cureyekî çêreya ku ji pelên wê baçik tên çêkirin |
| **tivir** | cureyekî hêşinahiyê ye û nepijî tê xwarin |
| **tivanc** | jan û êşa ku endamê zedegirtî diqurêfe; tezî |
| **-êş û tivanc kişandin** | qolinc ketin endamekî û ew der quraftin |
| **tivancî** | jandan û êşîn endamê zedegirtî |
| **tivil** | 1. qaşil 2. kirasê maran |
| **tiving** | tifing |
| **tivîlk** | cureyekî kevokan e |
| **tiwanî** | 1. hêz û qudûm 2. şiyan û kanîn |
| **tiwanîn/ditwane/bitwane** | karîn, şiyan |
| **tixa** | di dab û nêrîtên filehan de lawikê negihiştî |

| | |
|---|---|
| **tixavk** | qalikê ku li ser şîrê kelandî digire |
| **tixis** | kok û qelew |
| **tixûb** | 1. kevir, qûç an jî nîşaneya ku du cihan ji hev cihê dike 2. hidûd, sîtar *“ji dijminahiyê re tixûb tuneye” |
| **-tixûbê xwe zanîn** | 1. persenga devê xwe zanîn 2. şûna piyê xwe nas kirin |
| **tiyan** | siniya firinê |
| **tiyen** | qeware/qebare |
| **tiz** | vîz |
| **tiz kirin** | vîz kirin |
| **tizbî** | şirdana 33 an jî 99 moriyên ku pê zikr û tesbîhat tên kişandin*“tizbî, bê serkêş nabe” |
| **tizik** | tilor, tabût, qûn |
| **tizrûg** | zirî |
| **tî [I]** | birayê mêrê jinê |
| **tî [II]** | 1. kesê ku bêav maye2. kese ku av lê lazim e *“ew dikare mirovî tî bibe ser avê, cardin tî bîne” |
| **tî bûn** | 1. bêav man 2. av lê lazim bûn |
| **tîj** | dengê zîz |
| **tîjmar** | kurm |
| **tîk** | tiştê ku vît disekine, çikilandî |
| **-tîk sekinîn** | çik li piyan sekinîn |
| **tîkayî** | rewşa tiştê ku dirêjayî hatiye çikilandin |
| **tîk bûn** | vît bûn |
| **tîke** | 1. parçe 2. nermegoştê parçekirî |
| **tîke kirin** | 1. parçe kirin 2. kîte kirin |
| **tîk kirin** | vît kirin |
| **tîl** | 1. cihê ku qeşa girtiye û şimşat e 2. cihê ku mirov xwe lê dişiqitîne |
| **-xwe tîlê xistin** | xwe li ser qeşayê şiqitandin |
| **tîla** | bez |
| **-tîlayên çavan** | di aliyê derveyê çavan de bezê ku reşik di navendê de bi cih bûye |

| | |
|---|---|
| **tîlik** | 1. kevirê meht ê biçûk 2. kevirê tixûbî |
| **tîlolik** | cureyekî şîraniya ku ji şîr, şekir û ardê birincî tê çêkirin; şîrşêrk |
| **tîmanc** | pirtiyê ku pê cihê qulbûyî tê pînekirin |
| **tîmar** | 1. tedawî 2. lênêrîn3. (hesp) paqijî 4. perwerde |
| **tîmar bûn** | 1. tedawî bûn2. perwerde bûn |
| **tîmar kirin** | 1. tedawî kirin2. perwerde kirin |
| **tîn** | 1. germahî, sênc, heraret2. dûkel, kel |
| **tînbir** | dermanê ku herareta cendêk dadixe asteke asayî |
| **tîn dan** | 1. germahî dan, sincirîn 2. kelîn, dûkel bi ser ketin |
| **tînpîv** | amûra ku rêjeya germa heyî dipîve |
| **tîp [I]** | herf |
| **tîp [II]** | desteyeke leşkeran, desteyeke siwaran |
| **tîp [III]** | 1. di hêzên bejayî de desteya ku ji du hengên pêwist pêk tê 2. di hêzên hewayî de desteyeke ji balafir û navgînên destekar pêk tê |
| **tîprêz** | kesê ku nivîsekê derbasî kombersê dike |
| **tîprêzî** | karê tomarkirina nivîsan di kombersê de |
| **tîq** | dengê kenê |
| **tîtetîq/tîqînî** | hîrehîr |
| **-tîqînî pê ketin** | ji nişkê ve bi awazeke bilind kenîn |
| **Tîr [I]** | gerestêrkek e |
| **tîr [II]** | 1. kesîf 2. nezelal3. rengê girtî *“tîr çêkim dan diçe, rehn çêkim nan diçe” |
| **tîr [III]** | çeka berê ya ku bi kevanê dihate avêtin |
| **-tîr ji kevanê filitî/pekiya** | tiştê ku qewimî êdî jêveger ne pêkan e |
| **-tîr lê rabûn** | tivancî û qolincî bûyîn |
| **tîravêj/tîrkêş** | kesê ku bi kevanê tîran diavêje |
| **tîre** | 1. hoz 2. tax |
| **tîredar** | kesê ku ji binemaleyeke nas e; xwedanhoz |
| **tîremar** | marê biçûk, têjikê marî |
| **tîrendaz** | kesê ku meşqa tîrkêşiyê dîtiye |
| **tîrendazî** | perwerdeya li ser tîrkêşiyê |

| | |
|---|---|
| **tîrêj** | baqek şewla ku ji kana şewlê derdikeve û li her aliyî belav dibe |
| **tîrêjke** | şemala ji nişkê ve |
| **tîrêjpîv** | amûra ku tewsa şewla heyî dipîve |
| **tîrik** | kerdenek, kirdan |
| **tîrk** | derziya saetê |
| **tîrke** | derziya alavên pîvandinê |
| **tîr kirin** | 1. (reng) girtî û tarî kirin 2. (tiştê rehn) hindekî hişk kirin |
| **Tîrmeh** | meha heftemîn a salnameya zayînî |
| **tîş** | qelş |
| **-tîş lê ketin** | derizîn |
| **-tîş û qertîş pê ketin** | qelişîn û qalik dan |
| **tîştîşî** | qelşqelşî |
| **tîtik** | 1. pêlîstok 2. amanên avê yên biçûk 3. elbik |
| **tîz [I]** | terane, tinaze |
| **-tîz pê kirin** | tinaze pê kirin |
| **tîz [II]** | naziyên ji bo fizirîna ji karekî |
| **-xwe dan tîzan** | ji peywirê fizirîn *“xwe bidî tîzan nedî tîzan, tu dê bidî heqê gêzan” |
| **tîz [III]** | refesa sewalên çarpê |
| **-tîz dan xwe** | refes avêtin |
| **tîz [IV]** | lezgîn |
| **tîzik** | refes, lotik |
| **tîzî** | lezgînî |
| **to** | tixafka li ser mastî |
| **tobe** | poşmaniya ji tawan û gunehan |
| **tobe kirin** | ji ber xeletiyên berê ve poşman bûn û ji wan vegerîn |
| **tof** | birek mirov/tişt; kome |
| **tofan** | 1. barana pir giran2. karesata xwezayî ya ku ji ber barana gur pêk tê |
| **tog** | bêheya |
| **tohmet** | 1. qebahet 2. tawanbarkirina kesekî ji ber sûcekî ku nekirî ve |
| **tol [I]** | 1. bêheya 2. qûnek, qûndiryayî |

| | |
|---|---|
| **tol [II]** | bersivdana sitemê û parastina mafê rewa; evez, întiqam |
| **-tol hilanîn** | evez standin, întiqam jê standin |
| **tol [III]** | nijad, pişt û zuriyet |
| **tola** | şîraniyeke ku ji penîr û gezoyê tê çêkirin |
| **tolajo** | kesê ku întiqama xwe hildigire |
| **tolaz** | sersar û doxînsist |
| **toleke** | cureyekî gulan e |
| **tolgîn** | cureyekî gulan e |
| **tolhildan** | 1. întiqam 2. heyfhilanîn *“çûye tolhildanê, li seyda hestiyan digere” |
| **tolhildêr** | ewezstandî |
| **tolik [I]** | cureyekî gulan e |
| **tolik [II]** | porê ku bi ser eniyê ve xwar dibe; tûncik |
| **toloz** | malêz, xilt, gildîn |
| **tomar** | qeyda nivîsar û wêneyan |
| **tomargeh** | cihê taybet ê ji bo qeydkirina deng, reng û nivîsan |
| **-tomar kirin** | nivîs qeyd kirin |
| **tomav** | avik an jî tovê nêrzatiyê |
| **tomerî** | giş li ser hev û bi komasî |
| **tombiz** | 1. çekeke cengê ya kevn e; gurzê hesinî2. qelew *“hat ji der de, tombiz di ber de” |
| **top** | çekeke leşkerî ya mezin û giran e |
| **topal** | kulek |
| **topalî** | kulekî |
| **topavêj** | navgîneke leşkerî ya ku guleyên mezin diavêje |
| **topebaran** | cihek dan ber topan |
| **topebaran kirin** | top lê girêdan |
| **toq** | qeyda stûyî *“ji şeytên zanetir, toq û nalet di stûyan de ye” |
| **-toqa şeytên ketin** | stûyê yekî engirîn û cardin venegerîn rastiyê |
| **toqandin/ditoqîne/bitoqîne** | 1. gef û gur li dorê firandin 2. tirs û saw xistin dilan |

| | |
|---|---|
| **toqe** | 1. avzûma hesinî ya ku her du aliyên kemberê digihîne hev 2. alava ku jin li porê xwe dixin da ku ji hev belav nebe |
| **toqîn/ditoqe /bitoqe** | 1. ji tirsan bizdîn 2. qutifîn |
| **tor [I]** | 1. nûgihayî 2. xav |
| **tor [II]** | tayên raçandî yên ji bo masîgiriyê; şebeke*"her car kewa gozel nakeve torê" |
| **-tora agahiyan** | şebekeya mehlûmatan |
| **-tora masiyan** | şebekeya masiyan |
| **-tora sîxûran** | şebekeya casûsan |
| **-tor avêtin** | (ji bo masîgirtinê) şebeke avêtin nava avê |
| **-tor û tey** | tim û tim |
| **tor [III]** | janên beriya bûyîna zarokî |
| **torandin/ditorîne/bitorîne** | xeyidandin |
| **toranî** | kesê ku ji xebatê aciz dibe û selemtî-selemtî digere |
| **toraq** | adaneke şîr e û ji dewê kelandî tê bidestxistin*"toraqa îro, ji dewê sibehê çêtir e" |
| **-toraqa yekî danîn** | ser nanê wî 1. para yekî dayîn û ji şirîkatiyê derxistin2. xeyidandin û şandin |
| **torbe** | telîs |
| **tore [I]** | sil, bihêrs |
| **-tore bûn** | sil bûn, bihêrs bûn |
| **tore** | 1. huner û rewişt 2. wêje û tîtal |
| **-toreyên giştî** | dab û nêrîtên civakê yên ku rayîşa danûstandinê diyar dikin |
| **torevan** | şarezayê helbest, çîrok, pexşan û hwd; wêjenas |
| **torgî** | doxîna şalwaran |
| **torim** | têjika hêştirê, kudik |
| **torin** | 1. ader, esîlza 2. kaw û kibar |
| **torinî** | 1. aderî, esîlzatî 2. kawî û kibarî |
| **torîk** | keftar |

| | |
|---|---|
| **torîn/ditore/ bitore** | xeyidîn, su hatin |
| **torm** | têjika hêştirê |
| **tortore** | qure û olintî |
| **toşbî** | endamekî ku aviyeke zeliqokî davêje derve û ji şaneyên çêrmî pêk tê |
| **total bûn** | gindirîn |
| **tot bûn** | total bûn *"hêk li ser sêrî nasekine û tot dibe" |
| **totik/toto [I]** | (di zimanê zarokan de) xwarin |
| **totik [II]** | aqil |
| **totikvala** | kêmaqil, serkundir*"bike kalan bixwe malan, tu dê çi bikî bi xortên totikvala" |
| **totirne** | 1. tîtal, telhîn û dirêj2. bi dest û pê |
| **tov** | 1. avika ku giyaneweran çêdike; tomav, menî2. kakilê ku çêre û dar jê çêdibin; navnêrî *"tovê xweziyan, şîn nabe" |
| **-tov reşandin** | bizre/toxim reşandin |
| **toz** | parçeyên pir biçûk |
| **tozî** | parçe, bir |
| **tozî kirin** | birbirî kirin |
| **tozik** | daşik, caş |
| **tu [II]** | (r) cînavka yekjimar a ji bo kesê duyemîn |
| **tu [II]** | 1. hîç 2. qe, qet*"aşvan tu car nabe poşman" |
| **tund** | 1. zexm 2. sext 3. pêkutî |
| **tundî** | 1. zexmî 2. sextî 3. pêkutî |
| **tundraw** | 1. alîgirê rêmanên toqandinê 2. serveçûyî |
| **tune** | 1. netêw, nîn 2. net, sifir |
| **tune bûn** | 1. netêw bûn, ji holê rabûn 2. net bûn |
| **tune kirin** | 1. ji holê rakirin2. net kirin |
| **tunetî** | 1. nebûn 2. xizanî*"tunetî, nîrê hesinî ye" |
| **turindî** | cin |
| **turt** | hişk, sext |
| **tut** | lîstikvanê ku ji lîstikê hatiye avêtin |
| **tut bûn** | ji lîstikê hatin avêtin |
| **tut kirin** | ji lîstikê avêtin |

| | |
|---|---|
| **tuvandin/dit uvîne/bituvî ne** | betal kirin |
| **tuvanîn/ditu vane/bituva ne** | betal bûn |
| **tuwanc** | gotina sergirtî |
| **tuxt** | mengiraniyeke ku bi qasî 325 gramî ye |
| **tuxyan** | harî û isyankarî |
| **tû [I]** | 1. cureyekî daran e2. mêweyên vê darê*“dar bitû ye, lê xwedî tûle ye?” |
| **tû [II]** | tûk |
| **-tûyî devê hev kirin** | bi yekdevî axaftin û heman tişt dubare kirin tûfirengî mêweyek e |
| **tûj** | 1. neko, xarkirî 2. tehl |
| **tûjandin/dit ûjîne/bitûjîn e** | der heqê yekî de lêpirsîn dan destpêkirin |
| **tûj bûn** | 1. amadeyî qutkirinê bûn, zot bûn 2. tehl bûn *“şûrê kê tûj be, dinyayê ew dixwe” |
| **tûj kirin** | 1. xar kirin, amadeyî qutkirinê kirin 2. tehl kirin |
| **tûk [I]** | şilahiya ku ji qirika merivî derdive, tif |
| **-tûk kirin** | şilahiya di qirikê de avêtin derve |
| **-tûka xwe/xweziya xwe daqurtandin** | ji gotina xwe poşman bûn |
| **tûk [II]** | cureyekî çivîkan e |
| **tûk [III]** | pirç, pûrt |
| **tûkme** | berk, metîn, xurt |
| **tûl [I]** | 1. şefaf û tenik 2. pirtiyê tenik û şefaf |
| **tûl [I]** | vehundirîn, veciniqîn |
| **-tûl dan** | veciniqîn, vehundirîn |
| **-tul dan ser xwe** | baz dan ser xwe, vehundirîn ser xwe |
| **tûle** | têjikên seg û guran*“bextê çil rojên çileyî, tajiyê tûleyî û hespê quleyî tuneye” |

| | |
|---|---|
| **tûlemar** | cureyekî marên girs e |
| **tûlik** | 1. (ji bo tiştên lûlekî û devteng) teng 2. tûle tûlincî rûniştin wekî kûçikan rûniştin |
| **tûm** | 1. baq 2. kêrt |
| **tûman [I]** | qerfok |
| **tûman [II]** | 1. şalwar 2. nîvê dêreyê jinan ê ji navikê berjêrtir e |
| **tûmik** | 1. baqekî biçûk 2. girik |
| **tûmtûmî** | baqek li vir û baqek li dera han |
| **tûnc** | cureyekî madenan e |
| **tûncik** | porê li eniyê |
| **tûng** | lûleya ji kaxetîta qalind |
| **tûqesp** | tûyên reş |
| **tûr** | 1. kîs, derdan 2.heban3. çembera dorê *"tûrê parsekan, tu carî tijî nabe" |
| **-tûra stûyî** | katara stûyî |
| **tûrqul** | derewîn |
| **tûrqulî** | derewînî |
| **tûre** | navê giştî yê rehçikên spî yên ku hişyariyên sehek û hereketan ji mejiyî dişînin endamên din |
| **-sazûmana tûreyê** | di cendêk de pergala tûreyan |
| **tûrenasî** | beşa pisporiyê ya ku li ser tûreyê lêkolî nan dike |
| **tûrik** | kîsê biçûk |
| **tûş** | 1. dûş, îstiqamet 2. alî |
| **-tûşî hev bûn** | 1. pergî hev hatin 2. li hev xistin 3. bi hev re têkiliya zayendî danîn |
| **-tûşî hev kirin** | 1. pergî hev anîn 2. berdan hev3. (da ku bi hev re têkiliya zayendî daynin) derfet amade kirin |
| **tût [I]** | kund |
| **tût [II]** | dengê tûtika erebeyan |
| **tût [III]** | uryan, repal |
| **-tût û rût** | 1. repal û tazî2. destevala û bêçek 3. bêmal û deyndar 4. bêçêre û bêdar 5. vikvala û bêeşya |
| **-tût û rût bûn** | repal û tazî bûn |

| | |
|---|---|
| **-tût û rût kirin** | repal û tazî kirin |
| **tûtak** | tûtî |
| **tûtevîn** | cureyekî çivîkan e |
| **tûtik [I]** | fîq |
| **tûtik [II]** | lawikê viringî; kûto |
| **tûtî** | çivîkeke ku axaftina mirovan dubare dike |
| **tûtya [I]** | şîrê çivîkan; ango tiştê nedîtî û nebînayî |
| **tûtya [II]** | madenê çingoyê |
| **tûx [I]** | kirdan, kerdenek |
| **tûx [II]** | qalik û qertîşa li ser tiştên sirûştî; titqal |
| **tûxavk** | tixavk |
| **tûzik [I]** | cureyekî daran e |
| **tûzik [II]** | cureyekî çêreyê ye û tereter tê xwarin |

# U

| | |
|---|---|
| **U/u** | tîpa bîst û pêncemîn a alfabeya kurdî ye; dengdêreke kurt e, cîderka wê navderkî ye, di belavbûna wê de dev gilover e û asta belav-bûna wê bilind e |
| **ufuq** | aso |
| **uh!** | baneşana tirsandinê |
| **-uhî yekî kirin** | tirsandin û qewirandin |
| **umet** | 1. bawermendên ku peyrewiya Cn. Pêxember eleyhiselamî dikin 2. peyrewên pêxemberên din (silava Xwedê ser hemûyan be) |
| **umîd** | hêvî, bendeman, omit, mefer umîdwar hêvîdar, bendewar, |
| **omitwar** | , meferdar |
| **umr** | 1. emr 2. temen *“heta Heleb bû Heleb, umrê pîrika te çû” |
| **umre** | ji bilî rojên hecê yên diyarkirî tewafa Beytê |
| **urf** | dab û nêrît |
| **-urfa deverê** | dab û nêrîtên herêmê |
| **urûsî** | pace |
| **uryan** | rût, tazî, şilf û tazî |
| **uskere** | tas |
| **utifk** | gûşiyekî tiriyan ê biçûk |

# Û

| | |
|---|---|
| **û/Û** | tîpa bîst û şeşemîn a alfabeya kurdî ye; dengdêreke dirêj e, cîderka wê paşderkî ye, di belavbûna wê de dev gilover e û asta belavbûna wê bilind e |
| **û** | gihaneka navîna du peyv an jî hevokan |
| **ûc** | 1. dêw, tewa 2. ziha |
| **ûd** | cureyekî alavên mûsîqayî ye |
| **ûdjen** | kesê ku li ûdê dixe |
| **ûf** | hûf, pûf |
| **ûf kirin** | bi carekê de hûf kirin û daqurtandin |
| **ûfeûf** | hûfehûf, pûfepûf |
| **ûfeûf kirin** | hûfehûf kirin, pûfepûf kirin |
| **ûş** | birîn |
| **-êş û ûş lê rabûn** | derd û kul lê peyde bûn |
| **-êş û ûş lê rakirin** | derd û kul lê peyde kirin |
| **ûşt** | sedem, sebeb |
| **ûşteûşt** | sergêjî û bela |
| **-anîn ûşteûştê** | pir sergêjî û bela jê re çêkirin |

# V

| | |
|---|---|
| **v/V** | tîpa bist û heftemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê diranlêvkî ye, awayê belavbûna wê fîzek û nerm e |
| **va** | 1. evê han 2. lê binêre*“va nîna ye, tirnîna li paş tê” |
| **-va ye tê** | lê binêre ev kes/ tişt tê |
| **vac** | aqil û sirafet, feraset |
| **vajî** | 1. serobino 2. derxistina tiştê hundir li derve3. kelevajî |
| **vajî bûn** | 1. serobino bûn2. hundir derketin derve3. kelevajî bûn |
| **vajî kirin** | 1. serobino kirin2. hundir derxistin derve 3. kelevajî kirin |
| **vala** | xalî, ne tijî *“bi aqilê vala, tu nagihêjî hevalan” |
| **vala bûn** | di hundir de tiştek neman |
| **valahî** | 1. xalîtî 2. feza |
| **van** | awayê tewandî yê/ev/a pirjimar |
| **varik** | mirîşka berhêk*“varikên nû rabûne, hêkên sor dikin” |
| **varû** | paşrû, aliyê piştê |
| **varyoz** | mîrkut |
| **vatinî** | 1. peywir 2. wezîfe3. erk |
| **vawartin/divawêre/bivawêre** | tiştê qenc ji yê xerab cihê kirin |
| **vawêr** | 1. keyskirî 2. cihê |
| **vawêr kirin** | keys kirin |
| **ve** | ecêb, veh |
| **veanî/vediîne(vetîne)/vebîne** | tewandin |
| **vebanîn/vedibane/vebane** | hînî kesekî/rewşekî nebûn û lê zor hatin |
| **veberhênan** | razemeniya aborî |
| **-veberhênana** | karê hilberandina ceryanê |

| | |
|---|---|
| **wizeya gêrebayî** | |
| **veberhêner** | kesê ku di qadekê de razemeniyan dike |
| **vebestin/vedibeste/vebeste** | dubare girêdan |
| **vebijartin/vedibijêre/ vebijêre** | 1. çê û neçê ji hev veqetandin 2. kêrhatî û bêkêr ji hev cihê kirin |
| **vebijêrk** | 1. xala hilbijartinê2. şiq |
| **vebijîn/vedibije/vebije** | ji awayê cemidî derketin; helîn |
| **vebir** | 1. heyameke kurt 2. delîve |
| **vebirî** | 1. teqez 2. keyskirî |
| **vebirîn/vedibire/vebire** | 1. qerar dan 2. bi kurtî çareser kirin |
| **vebûn/vedibe/vebe** | negirtî bûn, (tiştê devgirtî ji wê rewşê) xilas bûn |
| **veciniqandin /vediciniqîne / veciniqîne** | 1. silikandin 2. tirsandin3. bi awayekî tirsandî ji xewê rakirin |
| **veciniqîn/vediciniqe** | 1. silikîn 2. tirsîn 3. bi awayekî tirsiyayî ji xewê rabûn |
| **vecinoq** | waswasok û tirsonek |
| **veçinîn/vediçine/veçine** | 1. vexwarin 2. xwe jê girtin 3. (tiştê hûnandî) çavî bi çavî tehmîr kirin |
| **veçirandin/vediçirîne veçirîne** | (tiştê hûnandî) vereşandin |
| **veçirikandin/ vediçirikîne/ veçirikîne** | 1. xwe hilkutan, xwe hildan û li erdê xistin 2. xwe vepincirandin |
| **veçirîn/vediçire/veçire** | (tiştê hûnandî) jixweber vereşîn |
| **vedan/vedide/vede** | kolan |
| **-ser vedan** | tiştê veşartî eşkere kirin |

| | |
|---|---|
| **veder** | 1. tecrîdbûyî 2. qewirandî |
| **veder kirin** | 1. qewirandin2. tecrîd kirin |
| **vedirûn/vedidirû/vedirû** | cihê diriyayî an jî bişkuvî dubare û baş dirûn |
| **vedîtin/vedibîne/vebîne** | 1. kişf kirin 2. pê hesîn |
| **vedizîn/vedidize/vedize** | 1. xwe veşartin 2. xwe bilandin 3. fizirîn |
| **vedor** | ast, merhele |
| **vedorî** | bi dorvegerî |
| **vefirîn/vedifire/vefire** | li tiştekî asê bûn û şunde pekîn |
| **vegemirandin/vedigemirîne/ vegemirîne** | 1. dabêlandin 2. kumişîn ser *“li ber siya şêrî be, bila te vegemirîne” |
| **veger** | 1. zivirîn 2. fetl |
| **vegerandin/vedigerîne/vegerîne** | 1. zivirandin2. fetilandin |
| **vegerîn/vedigere/vegere** | **1**. zivirîn 2. fetilîn |
| **vegirtin/vedigire/vegire** | **1**. fetih kirin 2. îşxal kirin 3. şunde wergirtin4. rakişandin |
| **vegotin/vedibêje/vebêje** | **1**. qise kirin 2. behs kirin 3. salix dan |
| **veguhartin/vediguhêre/veguhêre** | 1. tiştek li bal tiştekî din ve dagerandin2. teşe dan |
| **veguherîn/vediguhere/ veguhere** | teşe girtin |
| **veguhêztin/vediguhêze/veguhêze** | 1. neqil kirin2. ferehte kirin, tayîn kirin |
| **vehanîn/vetîne/vebîne** | 1. şunde vegerandin 2. tewandin, badan |

| | |
|---|---|
| **vehatin/vetê /vebê** | şunde vegerîn, dagerîn |
| **vehejandin/vedihejîne/ vehejîne** | 1. ziqinandin2. bi hejandinê ji xewê rakirin |
| **vehesîn/vedi hese/vehese** | westa xwe wergirtin |
| **vehewandin/ vedihewîne/ vehewîne** | êwirandin |
| **vehiştin/vedi hêle/vehêle** | 1. para ve danîn 2. radest kirin, îade kirin |
| **vejandin/ved ijîne/vejîne** | **1**. jîndar kirin, ruh dan ber 2. domdar kirin |
| **vejartin/vedi jêre/vejêre** | **1**. ji hev veqetandin2. bi keys û pergal kirin |
| **vejen** | 1. hêza bizavê, taqet2. çirûsk 3. hejek |
| **vejîn/vedije/ veje** | 1. jîndar bûn, giyanewer bûn2. ruh lê teze bûn |
| **veketin/vedi keve/vekeve** | 1. velezîn 2. razan |
| **vekêşîn/vedi kişe/vekişe** | 1. para ve zivirîn 2. şunde fetilîn 3. (bêyî ku bifetile) şunde şunde çûn *“ger gotin ji gotinê bikişe, gotin ji eslê xwe vedikişe” |
| **vekirin/vedik e/veke** | ji rewşa girtîbûnê rizgar kirin *“huner çek e, di bin çengê xwe ke, roja ku hewce bû veke” |
| **vekirî** | negirtî |
| **vekît** | (r) îmla, rastnivîs |
| **vekîtandin/v edikîtîne/ vekîtîne** | awaz li gorî kîteyê par ve kirin |
| **vekolîn/vedi kole/vekole** | 1. lêkolîn kirin 2. mitale kirin |
| **vekuştin/ved ikuje/vekuje** | vemirandin, tefandin |
| **velerizîn/ved ilerize/veleri ze** | dev û diran şeqeşeq kirin; ricifîn |

| | |
|---|---|
| **velîstin/vedilîze/velîze** | 1. veciniqîn 2. şaşwaz bûn 3. firikîn 4. leqîn |
| **velo kirin** | wergerandin û hilweşandin |
| **vemaliştin/vedimale/ vemale** | devmilên xwe hildan *“hem vedimale, hem jî dinale” |
| **vemayîn/vedimîne/vemîne** | 1. egle bûn 2. dereng man |
| **vemirandin/ vedimirîne/vemirîne** | 1. damirandin, tefandin 2. nizm kirin3. aşt kirin *“agir bi êgir nayê vemirandin” |
| **vemirîn/vedimire/vemire** | **1**. damirîn, tefîn2. nizim bûn 3. aşt bûn |
| **venan/vedine/vene** | 1. danişîn, niştin 2. gestin*“mêşa gûyî, li gûyî vedine” |
| **-li yekî venan** | 1. gest kirin, pê ve dan 2. lê dan |
| **venandin/vedinîne/venîne** | 1. dirûtin, kêl kirin2. dan temaskirin 3. mîheng kirin |
| **venasîn/vedinase/venase** | 1. îtiraf kirin 2. pê beled bûn |
| **venêrîn/vedinêre/venêre** | 1. teselî kirin 2. payîn |
| **veniştin/vedinişe/venişe** | 1. venan 2. rûniştin3. melisîn, lîs bûn |
| **vepelişandin /vedipelişîne / vepelişîne** | 1. rûxandin erdê 2. deverû avêtin erdê |
| **vepelişîn/vedipelişe/ vepelişe** | 1. rûxîn erdê2. deverû ketin erdê |
| **veperimandin/vediperimîne/ veperimîne** | xwe gijgijandin û peraş kirin *“şêrê ku xwe vediperimîne, werîsî qetqetî dike” |

| | |
|---|---|
| **veperimîn/vediperime/veperime** | gijgijîn û peraş bûn |
| **vepesirandin/vedipesirîne/ vepesirîne** | 1. aşt kirin 2. rawestandin û arimandin |
| **vepesirî** | 1. aştbûyî 2. tebitî û arimî |
| **vepesirîn/vedipesire/ vepesire** | 1. aşt bûn 2. rawestin û arimîn |
| **vepezandin/ vedipezîne/vepezîne** | 1. pezav dan xwe, xwe rakişandin 2. fortê xwe avêtin |
| **vepijiqîn/vedipijiqe/vepijiqe** | ji hev belav bûn |
| **vepirsîn/vedipirse/vepirse** | li pey hev pirsîn, pirsîn û cardin pirsîn |
| **veqetandek** | (r) qertafên ku mêjer û zayendê dinimînin |
| **veqetandin/ vediqetîne/ veqetîne** | 1. cihê kirin2. mezaxtin 3. ji hev jibartin |
| **veqetîn/vediqete/veqete** | 1. cihê bûn 2. tenê man, terikandin |
| **verestin/vedirese/veres** | e xwe ji girêdan û qeydkirinê rizgarkirin û bazdan; xwe ji destan derxistin |
| **vereşandin/vedireşîne/ vereşîne** | 1. (tiştê ku hatiye xwarin) verijandin2. vala kirin 3. (tiştê hûnandî an jî jenandî) xera kirin 4. (nivîsên kevnare li gor rêbazeke zanistî) xwendin |
| **vereşîn/vedireşe/vereşe** | 1. (xwarin û vexwerina ku çûye hundir) cardin veder bûn 2. (tiştê hûnandî an jî jenandî) xera bûn 3. (nivîsên kevnare li gor rêbazeke zanistî) hatin xwendin |
| **verê kirin** | şun de vegerandin |
| **verês** | rastnivîs |
| **verêstin/vedirêse/verêse** | li gorî rêzanekê kişandina peyvan |
| **-şaşiyên verêstinê** | şaşiyên rastnivîsê |

| | |
|---|---|
| **verêtin/vedirêje/verêje** | **1**. (kinc) reng lê çilmisîn2. vala kirin |
| **verij** | 1. derhata salane ya giştî 2. bermayî, puxte |
| **verijandin/vedirijîne/ verijîne** | 1. vala kirin 2. vereşandin |
| **verik** | pêlava ji mûyê hûnandî |
| **verotin/vediroje/veroje** | 1. darotin 2. kolan |
| **verûtin/vedirû/verû** | 1. bi dest rûçikandin, destverû kirin 2. hêncirandin, vegijgijandin |
| **veser** | pêvek, îlawe |
| **veso** | qehr û xeyd |
| **veşargeh** | 1. kulîn 2. mexzen |
| **veşarî** | veşartî |
| **veşartî** | nepen, nehênî |
| **veşartin/vedişêre/veşêre** | 1. ser nixumandin 2. li ber çavan wêde kirin*"rastiyê vemeşêr(-e) û mebêj(-e): 'ez im şêr' " |
| **veşartok** | lîstikeke zarokan e; çavgirtonek |
| **veşewitîn/vedişewite/ veşewite** | (ji ber berf, qeşa an tiştên kîmyewî) çêrm şewitîn |
| **veşûştin/vedişo/veşo** | 1. dawerivandin 2. baravî kirin |
| **veterisandin /vediterisîne / veterisîne** | 1. aşt kirin, arimandin 2. êşa yekî birîn |
| **veterisîne/vediterise/ veterise** | 1. aşt bûn, arimîn2. ji êşekê xelas bûn |
| **vetewşandin /veditewşîne /vetewşînê** | sersehmî kirin, sergêjî kirin |
| **vetewşîn/veditewşe/vetewşe** | sersehmî bûn, serî lê gêj bûn |

| | |
|---|---|
| **vewestîn/vediweste/veweste** | 1. vehesîn 2. rawestin |
| **vexistin/vedixe/vexe** | 1. danîn erdê 2. li erdê xistin |
| **vexuyan** | 1. elamet 2. berate3. şop |
| **vexwarin [I]** | aviya vexwarinê; noşav, meşrûbat |
| **vexwarin/vedixwe/vexwe[II]** | 1. veçinîn 2. noşîn, fir kirin 3. nîç kirin, hilçinandin *“kaniya ku tu avê jê vedixwî, keviran mavêjê” |
| **vexwende** | kesê ku gazî dêlindizekê an civînekê dike |
| **vexwendî** | kesê ku hatiye gazîkirin |
| **vexwendin/vedixwîne/vexwîne** | 1. gazî kirin, bang lê kirin 2. hatina kesekî xwestin |
| **vexwendname** | dawetiye |
| **vexwînî hev bûn** | (afirandiyên jîndar) li hev banîn û hînî hev bûn |
| **vezandin/vedizîne/vezîne** | velezandin |
| **vezel** | fayke |
| **vezelîn/vedizele/vezele** | wekî ku vekeve rûniştin |
| **vezen** | tiştê velezok |
| **vezîn/vedize/veze** | 1. peraş rûniştin 2. palûşk pê ketin 3. gilok bi paş ve ziyîn |
| **vezinîn/vedizine/vezine** | gilok bi paş ve ziyîn |
| **vêca** | îcar, vê carê |
| **vêketin** | 1. agir pê ketin, 2. çira çirûsîn |
| **vêl/vêlik** | amanên meht û nekûr, tehtevêlkî |
| **vêrik** | bendê ku pê xarûkan didirûn |
| **vêsan** | 1. bêhnvedan 2. palvedan 3. xwejibîr-vekirin |

| | |
|---|---|
| **vêsandin/vêdisîne/vêsîne** | **1**. tefandin, vemirandin2. rawestandin |
| **vêsiyayî** | 1. tefiyayî, vemirî2. rawestî *“westiyayiyan kir, vêsiyayiyan xwar” |
| **vêsîn/divêse/bivêse** | 1. tefîn, vemirîn 2. rawestin |
| **vêxistin/vêdixe/vêxe** | pê xistin |
| **vij** | sewalê ku qiloçên wî bi ser eniyê de tewiyane |
| **vijag** | peşk |
| **-vijag avêtin** | peşk avêtin |
| **vikvala** | xipxalî |
| **vin** | kesê ku di bêfila xwe de diaxive; gino, gingi nok |
| **vingîn/divinge/bivinge** | dengê vingîniyê pê ketin |
| **vingînî** | dengê firîna mêşan, guleyên fîşengan û hwd |
| **vir [I]** | ev cih |
| **-li vir** | li vî cihî |
| **-vir de wê de kirin** | 1. hok û çiv dan xwe 2. li behaneyan gerîn |
| **vir [II]** | 1. derew 2. devbelaşî3. pertaf *“heke ne vir bin, li mala me jî pir in” |
| **virçiqî** | 1. helisî 2. pelixî |
| **virçiqîn/divirçiqe/bivirçiqe** | 1. helisîn 2. pelixîn*“got: ‘heke tu çûyî bajarekî koran, tu jî çavekî xwe bigire; ne hêjîr divirçiqe ne jî hingiv genî dibe” |
| **virçevirç** | dengê domdar ê tiştên rehn ên ku tên pêpestkirin |
| **-virçevirça heriyê** | dengê meşa di nav heriya rehn de |
| **virçoqî** | 1. pelîse 2. pelixandî û şilavî |
| **virek** | 1. derewker 2. devçepel*“virek, çala xwe dikolin” |
| **virik** | jêçûna hundirî; vîjik, îshal |
| **-virik bi ser avê xistin** | pûçên yekî raxistin rastahiyê |
| **virikî bûn** | vîjikî bûn, hundir jê çûn |
| **viringî/virnî** | 1. zarokê nûbûyî 2. sewala nûzayî ya ku hîna mezin nebûye û ne hilikî ye |

| | |
|---|---|
| **viritandin/diviritîne/biviritîne** | 1. derbas kirin2. bi encam kirin |
| **viritîn/divirite/bivirite** | 1. derbas bûn 2. dawî lê hatin |
| **vir kirin** | 1. derew kirin 2. pertaf kirin |
| **virtoqî** | kesê ku tevgerên wî neçê ne |
| **virûvî** | goştê pijandî yê bidon |
| **virvirandin/divirvirîne/bivirvirîne** | virvirkî avêtin |
| **virvirk** | perwane |
| **virvirkî avêtin** | tê werkirin |
| **virvirok** | pêçke, toterîk |
| **viyan** | vîn |
| **viyan/divê/bivê** | 1. xwestin2. wisa mirad kirin*“ji dijmin re zarê xweş û pişta hişk divê” |
| **viz bûn** | 1. fizirîn 2. xwe xapandin |
| **vizek** | kesê ku xwe ji kar û baran vedidize |
| **vizeviz** | dengê firîna mêşan û xebata makîneyan |
| ***vizeviz kirin*** | 1. (mêş) firîn û deng derxistin 2. (makîne) xebîtîn û deng jê hatin 3. (aferîndeyê jîndar) pir lez çûn û hatin, bi lez xebitîn |
| **vizik** | cureyekî mêşên havînê yên biçûçik in û bi vedana xwe ve navdar in; mixik |
| **vizîn/divize/bivize** | bi dengekî bilind vingîn |
| **vizînî** | vingîniya xurt |
| **vizvizîk** | pêlîstokeke darînî ya ku bendekî lê dialînin û wisa dizivirînin |
| **-vizvizîk ketin qûnê** | di şûna xwe de netebitîn |
| **vîn** | 1. îrade 2. xwestek*“vîna dilan, di dayîna destan re diyar e” |
| **-vîna azad** | îradeya serbixwe |
| **-vîna siyasî** | îradeya ramyarî |
| **vîr** | çavên ku di kort de çûne |

| | |
|---|---|
| **vîr bûn** | çav di kort de çûn |
| **vît** | (guh) fît/bel |
| **vît kirin** | (guh) fît kirin/bel kirin |
| **vîzên** | dengê bayî |
| **vîzevîz** | dengê domdar ê bayî |
| **vîzevîz kirin** | bi dengekî xurt ba hatin |
| **vîz kirin** | 1. (bi xidikandina pişta wan) ker rakirin çargaviyan 2. nav tê dan, niçandin |

# W

| | |
|---|---|
| **W/w** | tîpa bîst û heştemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê lêvkî ye û awayê belavbûna wê nîvdengdêr e |
| **wa** | 1. ewê han 2. lê binêre*“wa ye goştê berxan e û li ber çavan e” |
| **-wa ye tê** | lê binêre ew kes/tişt tê |
| **wajav** | benda navendî ya ku avê digihîne her derê |
| **wan** | awayê tewandî yê cînavka /ew/ê, cînavka pirjimariyê ya ji bo kesê sêyemîn |
| **wane** | ders |
| **-wane dan** | ders dan |
| **wanegeh** | 1. fêrgeh 2. pol waqên dengê qaz, werdek û hwd |
| **waqewaq** | dengê domdar ê qaz, werdek û hwd |
| **waqewaq kirin** | (qaz, werdek û hwd) bi awayekî domdar deng derxistin war 1. qad 2. cih 3. şûnewar |
| **-warê bav û kalan** | niştingeha ku ji mêj ve malbatek lê akincî bûye |
| **-di vî warî de** | di vê mijarê de |
| **-ji waran man** | ji pêşketinê şunde man *“pesin daye, ji waran maye” |
| **wargeh** | 1. êwirgeh, stargeh2. biryargeh 3. welat |
| **warhêl** | kesê ku ji warê xwe bi dûr ketiye |
| **warîn** | kesê ku evîndar û girêdayiyê welatê xwe ye |
| **warkor** | 1. wareş 2. kordûnde |
| **warkoz** | germiyan |
| **warnişîn** | îqametgeh, êwirgeh |
| **warxan** | xan û man |
| **wase/waşok** | baz, başok |
| **wasite** | hemû alavên siwarbûn û barkêşiyê 2. navberkar navgîn |
| **wate [I]** | yanî, ango |
| **wate [II]** | mehne |
| **watedar** | mehnedar |
| **watenasî** | di zimanzaniyê de mehnenasî |

| | |
|---|---|
| **watewarî** | lêkolînên li ser mehneyan |
| **wawik** | cureyekî sewalên ku dişibihine guran; torîk, keftar |
| **waynefsî** | rewşa ku her kes ketiye tatêla nefsa xwe |
| **we** | awayê tewandî yê cînavka/hûn/ê |
| **webal** | guneh |
| **-webal ketin stûyê yekî** | guneh ketin para yekî |
| **weç** | 1. hewcetî 2. çilpiyê ziravik |
| **-li ser weçekî man** | 1. girêdayî mûyekî man 2. nêzîkî felaketê bûn |
| **weçe** | nesl, nifş |
| **-çak-kirina weçeyê** | helwestên başkirin û zêdekirina neslên jîndar |
| **-diyarkirina weçeyê** | helwestên daxistina rêjeya neslan |
| **wefa** | berdewamiya di dostî û evîndariyê de |
| **wefakar** | kesê ku di dostî û evîndariya xwe de domdar e |
| **weg** | sedsal, qirn |
| **wehşî** | jakaw, hov |
| **wek** | mîn, notl, fen |
| **-wek avê pê de çûyîn** | 1. bê xeletî berdewam kirin2. ji ber xwe de zanîn |
| **-wek baranê ser de barî** | 1. Xwedê pir mal dayê2. gule an jî kevir reşiyan ser |
| **wekat** | 1. diyar 2. kifş û servekirî |
| **wekat kirin** | 1. diyar kirin2. kifş û ser vekirin |
| **weke** | mîna, notla, fena |
| **wekhev** | yeksan |
| **wekhevî** | yeksanî |
| **wekî** | mîna, notla, mînanî, fenanî, fena *“şûşeya dilan, wekî ku dişkê cebar nabe” |
| **wekok** | 1. nimûne 2. mînak |
| **welam** | bersiv |
| **welaq** | 1. hespê ku ne ader e 2. sewalên sere yên malê; terîş |

| | |
|---|---|
| **welat** | 1. memleket 2. niştiman*“welatê neyaran, bi buhistan e” |
| **-welatê xerîbiyê** | 1. penaberî2. qurbetî |
| **welatî** | 1. hemwelatî 2. hembajarî 3. memleketî*“welat xweş e, bi welatiyan” |
| **-welatiyê qaşo** | xwedîgiravî ew jî ji wî welatî ye |
| **welatparêz** | niştimanperwer weled ewlad, zarok |
| **-dê weledê xwe avêtiye** | hewirzeyeke giran heye û kes li kesî xwedî dernakeve |
| **welê** | wisa *“ba çawa tê bênderê, welê bide ber bê” |
| **welî** | qencê Xwedê *“ji we liyan dikeve xwelî, ji xweliyan dikeve welî” |
| **wen** | dara bênîşt |
| **wenaq** | cureyekî nexweşiya bêvil û qirikê ya ku dibijine der û dorê jî |
| **wend** | 1. wêrek 2. pêsivik |
| **weqf** | saziya ku mal û milkê wê ji bo xêran hatiye veqetandin |
| **weqî** | mengiraniyeke bi qasî kîloyek û 300 qramî ye *“weqî, li her derê çar tuxt e” |
| **weranîn/wertîne/werîne** | 1. anîn 2. hilanîn*“diyê bibîne, dotê werîne” |
| **werar** | 1. tekamul, guherîn û stewîn 2. geşbûn, pêşketin |
| **werar kirin** | bi pêş xistin |
| **-bernameya werarkirina avadaniyê** | pêşniyarên pêşxistina rewşa welêt |
| **werbadan/werbadide/ werbade** | li hev alandin |
| **werbûn/werdibe/werbe** | 1. bi deverûkî pelişîn erdê 2. qulopanîkî gindirîn |
| **werdek** | cureyekî heywanên bibask ên malê ye, cureyekî wan ê çolê jî heye, ji qazan biçûktir e û pir ji avê hez dike; sone |
| **werê** | wisa, wilo |
| **werger** | tercume |
| **wergerandin /werdigerîne / wergerîne** | 1. tercume kirin 2. qulibandin3. hilweşandin |

| | |
|---|---|
| **wergerîn/werdigere/wergere** | 1. ji zimanekî derbasî zimanekî din bûn 2. ji temtêlekî derbasî yeke dîtir bûn3. qulibîn 4. hilweşîn |
| **wergêr** | tercuman |
| **wergêrî** | tercumanî |
| **wergirtin/werdigire/wergire** | 1. hildan 2. standin 3. li xwe kirin |
| **werhatin/wertê/werbê** | gevizîn |
| **werimandin/diwerimîne/biwerimîne** | 1. nepixandin2. perçifandin |
| **werimîn/diwerime/biwerime** | 1. nepixîn 2. perçifîn |
| **weris** | 1. bendê stûr ê hûnandî2. mîratxur *“mar pê veda, ji siya wêris tirsiya” |
| **weritandin/diweritîne/biweritîne** | 1. şaşwaz kirin2. xalifandin 3. xurifandin |
| **weritîn/diwerite/biwerite** | 1. şaşwaz bûn 2. xalifîn3. xurifîn |
| **werixîn/diwerixe/biwerixe** | terixîn |
| **werm** | temtêla tiştê ku nepixiye û hilpingiriye; perç |
| **werqilandin/diwerqilîne/biwerqilîne** | sekinandin, rawestandin |
| **werqilîn/diwerqile/biwerqile** | sekinîn, rawestin |
| **werqîl** | barê girêdayî; balî |
| **wert** | 1. zuriyet 2. nifşên nûhatî |
| **werwere** | demançe, şeşar |
| **werz** | 1. demsal 2. bîstan3. rewş û temtêl |
| **werze** | 1. zanistên hesabî2. ziraet, çandinî |

| | |
|---|---|
| **werzeba** | cureyekî bayên bakura rojhilat e |
| **werzek** | 1. zanayê zanistên hesabî 2. karkerê çandiniyê |
| -**wezareta werzeyê** | saziya karên çandiniyê |
| **werzêr** | werzek |
| **werzî** | demsalî |
| **werzişt** | 1. perwerdeya bedenî2. riyazet |
| **werziştkar** | kesê ku bedena xwe perwerde kiriye |
| **wesan** | 1. hişyarî 2. îxtar |
| **wesandin/diwesîne/biwesîne** | 1. hişyar kirin2. îxtar kirin 3. şandin pey |
| **wesem** | sorav |
| **wesle** | 1. parçe 2. gihaneka navbera tu tiştan |
| **wesp** | başbûna cureyê tiştekî |
| **west** | 1. betl 2. bizdîn |
| **-west girtin** | 1. vehesîn 2. rawestin |
| **westan** | 1. muhlet 2. navbir3. rawestan |
| **westandin/diwestîne/ biwestîne** | 1. betilandin2. bizdandin |
| **westîn/diweste/biweste** | 1. betilîn 2. bizdîn |
| **weş** | 1. qilqilîn û milmilîna tiştan 2. hej, leq |
| **weşan** | neşriyat, çapkirin |
| **-weşana yekser** | ragihandina zindî |
| **weşandin/diweşîne/biweşîne** | 1. çap kirin û belav kirin 2. hejandin, leqandin 3. rijandin |
| **weşanger** | kesê ku kovar, pirtûk û tiştên din çap dike û difroşe |
| **weşanxane** | firoşgeha ku pirtûkan çap dike û difiroşe |
| **weşîn/diweşe/biweşe** | 1. çap bûn û hatin belavkirin2. hejîn 3. rijîn |

| | |
|---|---|
| **weşk** | 1. arek 2. kevn û kot |
| **weşweşîn/di weşweşe/ biweşweşe** | 1. milmilîn2. çelexwarî meşîn 3. wekî sermestan tev gerîn |
| **wexer** | 1. koç 2. mirin |
| **wexer kirin** | 1. koç kirin mal bar kirin 2. mirin |
| **wexêr!** | oxir be! |
| **wexîm** | elametên aloziyê yên berî qeyranê |
| **wext** | dem, heyam *“her tişt di wextê xwe de xweş e” |
| **-wext teng bûyîn** | dema kirin û çêkirina tiştekî neman |
| **wextî** | demdemî |
| **wexm** | darbesta miriyan |
| **wey!** | baneşaneke şaşwaziyê ye |
| **wey li min!** | delîl li halê min! |
| **weyn** | 1. di kar an jî bernameyekê de peywira her lîstikvanî 2. hîle |
| **weyner** | hîlebaz |
| **weynê** | di kar an jî bernameyekê de lîstikvana jin |
| **weyno** | di kar an jî bernameyekê de lîstikvanê mêr |
| **wezaret** | 1. saziya dûgelê ya ku bi beşeke rêvebiriyê radibe; kizîrî 2. giregirî |
| **wezîr** | 1. kizîr, rêvebirê beşeke desthilatiyê 2. giregir*“her kes, wezîrê mala xwe ye” |
| **wezn** | 1. kêş, pîvan 2. azîne |
| **wezne** | di saziyan de cihê ku diravan werdigire û dide |
| **weznedar** | peywirdarê li ber wezneyê |
| **wê** | awayê tewandî yê cînavka/ew/ê, cînavka yekjimarî ya ji bo kesa duyemîn |
| **wêje** | 1. edebiyat 2. tore |
| **-wêjeya devkî** | edebiyata tomarnekirî ya di nava axafgeran de |
| **-wêjeya nivîskî** | edebiyeta axafgerî, dîtbarî û nîgaşî ya ku hatiye tomarkirin |
| **wêjeyî** | 1. edebî 2. toreyî |
| **wêjemend** | 1. edîb 2. torevan |
| **wêjenas** | 1. pisporê edebiyatê2. pisporê toreyê |

| | |
|---|---|
| **wêl** | 1. ajala ku ji keriyê xwe veqetiyaye 2. beredayî |
| **wêne** | 1. resm û şikilên ku tiştên heyî li ser kaxezê dinimînin; nîgar 2. cure, awa *”sê wêne dost hene: nano, gano, cano” |
| **-wêne girtin** | şikil kêşan |
| **wêneçîrok** | çîrokên ku bi wêneyan hatine şîrovekirin |
| **wêneguhêz/ wênegir** | amûra ku dîmenan wekî wêneyan vediguhêze ser kaxezan |
| **wênekêş** | kesê ku bi wêneguhêzê wêneyan dikêşe |
| **wêra** | egîd, wêrek |
| **wêran** | kavilbûyî û xopan |
| **-navekî giran li ser gundekî wêran** | navdariya bêbingeh |
| **wêran bûn** | kavil bûn, kevir li ser kêvir neman |
| **wêrane** | cihê kavilbûyî |
| **wêran kirin** | kavil kirin, kevir li ser kêvir nehiştin |
| **wêrandin/di wêrîne/biwê rîne** | 1. han dan 2. cesaret dan yekî |
| **wêrek** | bêtirs û egîd |
| **wêrîn/diwêr e/biwêre** | 1. cesaret kirin 2. netirsîn*“tu bihusta wî zêr daynî newêre” |
| **wiha** | bi vî awayî |
| **wijdan** | seheka berpirsiyariyê*“dilê hişk, wijdan tê de nasitire” |
| **wilayet** | parêzgeh |
| **wilo** | wiha, wisa |
| **winda** | 1. berze 2. binevat3. têkçûyî 4. heliyayî |
| **winda bûn** | 1. berze bûn, ji dest çûn 2. têk çûn 3. binevat bûn 4. helîn |
| **winda kirin** | 1. berze kirin, ji dest kirin 2. têk birin3. binevat kirin 4. helandin |
| **wir** | awayê tewandî yê cînavka/vir/ê |
| **wiş!** | baneşaneke di wateya |
| | /pî!/yê de |
| **wird** | duaya domdar |

| | |
|---|---|
| **wirêne kirin** | (ji ber nexweşiyeke giran an jî di xewê de) gotinên beletewş kirin, ji bestan peyivîn |
| **wisa** | wilo, bi wî awayî |
| **wize** | 1. taqet, hêz 2. şiyan3. vejen |
| **-wizeya gêrebayî** | hêza cereyanî |
| **-wizeya kakilî** | hêza atomî |
| **-wizeya mirovîn** | hêza însanî |
| **wî [I]** | awayê tewandî yê cînavka /ew/ê, cînavka yekjimarî ya ji bo kesê duyemîn |
| **wî [II]** | wiş!, pî! |
| **wîç** | vebijêrka pêkan û guherbar |
| **wîçewîç** | dengê çivîkan |
| **wîlayet** | eyalet, parêzgeh |
| **wîste** | daçek |
| **wîşt! [I]** | baneşana gazîkirin û hişyarkirinê |
| **wîşt [II]** | silav, pate |
| **wîştandin/di wîştîne/biwî ştîne** | 1. gazî kirin 2. fîtandin yekî 3. uhî yekî kirin 4. meçêtir miseletî serê yekî bûn 5. bi fîqê hişyar kirin |
| **-ma hinekan wîştandiye te?** | 1. ma tu dîn bûyî? 2. hinekan nav te daye/ niçandiye te? |
| **wîştînî** | fîtînî |
| **wîştewîşt** | dengê fîqê yî domdar |
| **wîtewît** | dengê teyr û çivîkan î domdar |
| **wuçan** | 1. navber 2. sekn, rawest |
| **-wuçana asayî** | betlaneya salane ya karmend û karkeran |
| **-wuçana nexweşiyê** | betlaneya ku karmend û karker di dema nexweşiyan de bi kar tînin |
| **-wuçan dan** | navber dan |
| **-wuçan girtin** | bi wêneguhêz an jî dîmenguhêzê rawesta tiştekî ecibandin û wêne/dîmen kişandin |

| | |
|---|---|
| **wuşe** | peyv, kelîme, bêje |
| **wuze** | vejen, taqet |
| **wutû** | hesinê ku di avasaziyê de tê bikaranîn |

# X

| | |
|---|---|
| **x/X** | tîpa bîst û nehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê ezmandevî û qirikî ye, awayê belavbûna wê nîvdengdêr e |
| **xaç** | nîşaneya filehan a wekî zêdekê ye; (+), selîb |
| **-xaç di paşilê de bûn** | 1. kesek bi bîsa xwe nehesandin2. dilhişkiya xwe nîşan nedan |
| **Xaça Sor** | rêxistineke filehan a tenduristiyê ye |
| **xaçepirs** | 1. kevala ku bersivên pirsan rast û berjêrkî têde têne bicihkirin2. pişkanê, pişkbazî |
| **xaçerê** | şahrê |
| **xaçerêz** | xaçepirs |
| **xaçirgan** | kuçikên datînin bin sêl û beroşê |
| **xaçparêz** | fileh |
| **xag** | xav |
| **xak** | 1. xwelî, ax 2. welat |
| **xakenas** | bêra kolan; pêmer |
| **xakî** | rengê axê |
| **xal [I]** | birayê diya mirovî*“bûka xalê, delaliya malê” |
| **xal [II]** | 1. deq, niqte 2. şanik |
| **xalbendî** | (r) di hevokê de awayê bikaranîna hin nîşaneyan; niqteşanî |
| **xale** | cureyekî bê ye |
| **xalebêhnok** | (r) di xalbendiyê de nîşaneya /;/ê |
| **xalî** | 1. vala 2. tenê 3. xewle |
| **xalî bûn** | 1. vala bûn 2. tenê bûn 3. xewle bûn |
| **xalîçe** | bêrkun, berik, merş |
| **xalojin** | jina xalê mirovî; jinxal |
| **xaltî** | xwişka diya mirovî*“bêhna diyan, tê ji xaltiyan” |
| **xalxalî** | deqdeqî |
| **xalxalok** | bihukek e |
| **xam** | tiştê destpêneketî an jî negihiştî |

| | |
|---|---|
| **-xam bûn** | (ji ber ku demeke dirêj nexebitiye an jî nereviyaye) her dera cendekê wî êşîn |
| **-xamiya sewalê şikandin** | derxistin derve û meşandin, xebitandin an jî bezandin |
| **-xam kirin** | (mirov an jî se walê ku nexebitiye an jî nebeziyaye) bi xebat an jî bezandinê pir westandin û cendek lê giran kirin |
| **xama** | 1. berzewac û negihiştî2. duşîze |
| **xame** | qelem, pênûs |
| **xamek** | 1. dareke ku rengê kulîlkên wê binefşî ye û bêhnxweş e 2. rengê binefşî |
| **xamoş** | kesê ku ramanên xwe ji kesî re venake û wan bi kesî re parve nake |
| **xamoşan** | kesê terkeser |
| **xamox** | ava peşîn a ku didine ser zeviya çandî |
| **xan [I]** | 1. mal û hal 2. êwirgeha rêwiyan *“dinya xan e, xan nabe bê mêvan e û însanê lê jî bazirgan e” |
| **-xan û sera** | koçk û qesr |
| **xan [II]** | 1. sifre, xwan 2. xwarin, xurek |
| **xan [III]** | 1. ast 2. temtêl |
| **xandar** | xwediyê êwirgeha rêwiyan |
| **xane** | mal, malik |
| **xanedan** | malbata ku ji nifşa kesayeteke dirokî ye |
| **xaneper** | malper |
| **xanenişîn** | karmendê ku piştî temambûna salên peywira wî ji xebatê hatiye veqetandin; karnişîn |
| **xangar** | rehekên ku li ser rûyê erdê şîn dibin û zêde ne bilind in |
| **xanik** | texteyê nanpehtinê |
| **xanim** | jina birûmet, stî |
| **xanî** | 1. avahiya ku mirov lê diêwirin; mal 2. xan û man; warxan *“xanî, li ser cemedê çênabe” |
| **xanûman** | xaniyê ku ji qatekî têkûz an jî ji çend qatan pêk tê |
| **xanût** | tevn |
| **xanxanik** | nivîsên ku bi alîkariya xêzan hatine destnîşankirin |
| **xap** | 1. fêl û gilor 2. dek û dolab |

| | |
|---|---|
| **xapandin/dixapîne/bixapîne** | 1. hîle li sêrî kirin2. weritandin 3. bilandin4. xirandin |
| **xapîn/dixape/bixape** | 1. tûşî dek û dolaba yekî hatin 2. weritîn 3. pê bilîn |
| **xapînok** | hîlebaz, dekbaz |
| **xapxapik** | şimikên ku binên wan darîn e |
| **xapxapok** | çivîkek e |
| **xapûr** | wêrane û kavilbûyî |
| **xar [I]** | kevirê ku alavên qutkirinê pê tên tûjkirin; hesan |
| **-xar kirin** | bi hesên tûj kirin |
| **xar [II]** | beza hespê |
| **-xar kirin** | hesp bezandin |
| **xar [III]** | parçeyên gilover ên di çîva tayeyan de |
| **xara [I]** | hespê beza |
| **xara [II]** | kevirê mermer |
| **xaraw** | kesê ceribandî û dinyadîtî |
| **xarik** | 1. hesanê biçûk 2. qada nava gund |
| **xarim** | xurom |
| **xarîz** | cureyekî xwarina ku ji arvan û rûnî tê çêkirin |
| **xarmût** | bazinê ku davêjin stûyê hespan û erebeyê pê ve girêdidin |
| **xarûk** | solên çêrmîn ên heyamên berê; çarix |
| **xarûz** | dendikên gûzan û hwd ên gelwazkirî |
| **xas** | 1. tiştê ku ji der ve de tiştek tev nebûyê, saf 2. piyê tazî |
| **xasma** | bi taybetî |
| **xasmêr** | mêrxas |
| **xasûk** | kone |
| **xaşe [I]** | xavika li ser hin endaman; pizdan |
| **xaşe [II]** | her tiştê ku hûrhûrî bûye |
| **xaşî** | telîsê mezin; bardan |
| **xatir** | 1. qedr û qîmet 2. destûr *“xatirê kûçikan tuneye, xatirê xwediyan heye” |
| **-xatir xwestin** | destûra veqetînê xwestin |

| | |
|---|---|
| **xatirnas** | kesê ku qedr û qîmetê kes û tiştan dizane |
| **xatûn** | 1. jin 2. jina esîlza3. keybanû *“kar ê karkeran, namûs a xatûnan e” |
| **xav** | 1. nepijî 2. nestewî 3. negihiştî *“di navbera dînîtî û biaqiltiyê de mûyekî xav heye“ |
| **-bûjenên xav** | têkberên xam |
| **xav bûn** | (rîs bi singîrê) nermik û sist bûn |
| **xav kirin** | (rîs bi singîrê) nermik û sist kirin |
| **xavik [I]** | 1. laçik 2. tulbend |
| **xavik [II]** | 1. pizdan 2. tebeqeya ku li ser tiştê kelandî pêk tê 3. to |
| **xavî** | 1. nepijîtî 2. nestewîtî3. negihiştîtî |
| **xawên** | 1. rûmet 2. şeref |
| **xawênî** | endamê rûmetê |
| **-serokê xawênî** | rêberê fexrî |
| **xawênşikû** | rêvebirê rêzdar |
| **xawêr** | rojhilat |
| **xawûşe** | kesê ku cendekê wî ji hêtan berjêrtir şileke bûye |
| **xawûşe bûn** | di hêtan de nivîşkan bûn |
| **xawûşe kirin** | di hêtan de nivîşkan kirin |
| **xax** | rezîl û riswa |
| **xaxî** | rezîltî û riswatî |
| **-xaxiyên nemayî kirin** | rezîltiyên nedîtî û nebînayî pêk anîn |
| **xayîn** | 1. qeleş 2. xax *“bi mirovê xayîn re megere” |
| **xayîntî/xayn etî** | 1. qeleşî2. xaxî |
| **xayîz** | 1. jixweveçûyî 2. neheşî |
| **xayîz bûn** | 1. dil jê çûn 2. ji xwe ve çûn |
| **xebat** | 1. kar 2. çalakî*“ketî, bi xebatê radibe” |
| **xebat kirin** | kar kirin |
| **xebatkar** | karker *“dara xebatkaran, tim bi ber e” |
| **xeber** | 1. nûçe 2. dijûn 3. agehî *“bê dev, xeber nayên tev” |
| **-xebera sar** | nûçeya diltezîn |

| | |
|---|---|
| **-xeber dan** | 1. axivîn 2. ragihandin*“xeberdan, bê dor tê ser nezanan” |
| **-dan xeberan** | sixêf û çêr gotin |
| **xeberoşk** | çîrok |
| **xebitandin/dixebitîne/ bixebitîne** | 1. karek bi kesekî dan kirin 2. amûrek dan şixulandin 3. bi kar anîn |
| **xebitîn/dixebite/bixebite** | 1. kar kirin 2. şixulîn3. hewl dan *“bixebite, heta ku xwîn di ber neynûkên te re bavêje” |
| **xebxeb** | (di devê giyaneweran de) lama binî ya ku didan li ser rêzbûne; binê erzenê |
| **xedar** | 1. bêrehm û bêwijdan2. bêgav û bêderman*“gîskî gote sibatê: ‘çirt û çirt sibatokê, ez giham diya xwe adarokê’; sibatê gote adarê: ‘bide min sê rojên xedar, ez dê gîskî ji latî bînim xwar’ ” |
| **xedeng** | tîra ku ji dara gêzê ye |
| **xef** | raz, bîs |
| **-di xef de girtin** | dizîka û ji nêşkê ve girtin û firsenda bizavê nedan |
| **-xef kirin** | veşartin |
| **xefe** | cihê teng, bêhewa û fetisok |
| **xefeng** | dervank |
| **xefik** | tele, dafik, bûse*“rovî, du caran nakeve xefikê” |
| **xefirxan** | nexweşiya pişikxerabûnê ya ku nexweşan pir dikuxîne |
| **xefirxanî** | kesê ku bi nexweşiya xefirxanê ketiye |
| **xeft** | konê piçûk ê şînan, çartaqa şînê |
| **xel [I]** | tirşbûna aşikê |
| **xel [II]** | niqteya ewlehiyê ya li derveyî tixûbên neteweyî |
| **xela** | kêmbûna debara jiyanê; tunetî *“mal an ji xelayê re, an ji belayê re” |
| **-xela rabûn** | tunetî pêk hatin |
| **-xelaya mêran rabûn** | di civakê de xîretkêş neman |
| **xelan** | 1. lihevalîn 2. tewîn |
| **xelandin/dixelîne/bixelîne** | 1. badan 2. tewandin |
| **xelas bûn** | 1. kuta bûn 2. qedîn 3. rizgar bûn *“bi mineminê, mirov xelas nabe ji jinê” |

| | |
|---|---|
| **xelas kirin** | 1. kuta kirin2. qedandin 3. rizgar kirin*“kes ji neyarê xwe re nabêje: ‘bila Xwedê te xelas bike’ ” |
| **xelat** | 1. diyarî, bexş 2. bexşîş |
| **-xelata şanaziyê** | nîşane an jî diyariya fexrî ya ku didine kesayetên girîng |
| **-xelat û celat** | şabaş û seza |
| **xelatgir** | kesê ku diyarî û bexşîşê hildide |
| **xelat kirin** | 1. diyarî kirin, lê bexşandin 2. bexşîş dan |
| **xeleng** | giyayê ku jê gêziyan çêdikin; hewşan |
| **xeleq** | 1. çembil 2. gustikên porî |
| **-xeleq kirin pozê yekî** | wekî hirça pozxeleqkirî li dû xwe gerandin û xwestekên xwe pê dan kirin |
| **xelet** | 1. çewt û ne rast 2. xulp |
| **xeletî** | 1. çewtî û nerastî 2. xulpî |
| **xeletî kirin** | 1. çewtî û nerastî kirin 2. xulpî kirin |
| **xelexopî** | kelexwarî |
| **xelî** | pir, zehf |
| **xelîc** | avteng |
| **xelîfe** | serokê hemû misilmanan |
| **xelîn/dixele/ bixele** | (mîde) li hev ketin, tirş bûn |
| **xelq** | 1. milet 2. ehalî 3. gel*“ji xelqê re masîgir e, ji xwe re kûsîgir e” |
| **xelûz** | kevirê reş ê ku dibe şewate û ardû; rijî |
| **xelwet** | 1. tenêtî 2. înziwa |
| **-ketin xelwetê** | ketin silûkê |
| **xem** | 1. kul 2. keser 3. derd 4. tatêl *“karê gavekî, xemên salekî ne” |
| **-xem kişandin** | ketin fikar û tatêlê |
| **-xem revandin** | dil rehet kirin |
| **xemgîn** | 1. dilbikul, keserkêş2. derdomerdo, dilbirîn, cegerxwîn |

| | |
|---|---|
| **xemilandin/ dixemilîne/ bixemilîne** | çîç kirin, bedew kirin |
| **xemilîn/dixemile/bixemile** | 1. çîç bûn 2. bedew bûn *“heta Xidir xemilî, dawet betilî” |
| **xemirîn/dixemire/bixemire** | (mêwe) gihiştin û reng guherandin xeml alavên bedewî û delaliyê*“zarok xemla mala ne” |
| **xemr** | mey, şerab |
| **xemrevîn** | kesê ku bi axaftinên xweş û şirîn |
| **xeman** | ji bîr dibe; aramdêr |
| **xemrî** | di rengê meyê de; |
| **xemsar** | 1. îhmalkar, bêhemal2. sersar |
| **xemsarî** | 1. îhmalkarî, bêhemalî2. sersarî |
| **xemxur** | dilsoz, muxlis |
| **xemxurî** | dilsozî, îxlas |
| **xenas** | fesad, ewan |
| **xenasî** | fesadî, ewanî |
| **xencer** | cureyekî kêrên cengî yên ku nikê wan xwar û tûj e *“xencer bira ye, tifing pismam e” |
| **xendeq** | 1. cihoka biber û kûr 2. çala kûr û fireh |
| **xengel** | cureyekî xwarina ku lewaşeyê hûr ê qutkirî bi goştê hêrandî dadigirin û dipêjin |
| **xeniqandin/ dixeniqîne/ bixeniqîne** | 1. fetisandin2. şeniqandin 3. bêhn lê çikandin *“kesîb ji tunebûnê diçe ku xwe |
| **bixeniqîne** | , dibîne ku dewlemend kêp li stûyê xwe dialîne; vedigere û dibêje: ‘dîsa jî şikir ji halê me re’ ” |
| **xeniqîn/dixeniqe/bixeniqe** | 1. fetisîn 2. şeniqîn3. behn lê çikîn |
| **xenî** | 1. dewlemend 2. destbelaş, comerd, sexî |
| **xenîmî çavan bûn** | (ji ber nankoriyê) tûşî karesatekê hatin |
| **xenûqe** | 1. xemlên li ber xeneqê; gerdenî 2. şirdan |

| | |
|---|---|
| **xenzirandin/ dixenzirîne/ bixenzirîne** | kizirandin |
| **xepar** | kax, aşêf |
| **xepartin/dix epêre/bixep êre** | kax kirin, aşêf kirin |
| **xepe** | dîn û cinî |
| **xepik** | dafik, tele |
| **xepse** | 1. deng û dor 2. şuloxî |
| **xepse** | kirin 1. bi dengê bilind qîjevîj kirin 2. şuloxî kirin |
| **xera** | 1. teqoze 2. feramûşî3. kavilbûyî 4. genîbûyî |
| **-xera bûn** | 1. teqoze bûn2. feramûş bûn 3. kavil bûn, hilweşîn, wêran bûn 4. genî bûn |
| **-xera kirin** | 1. teqoze kirin2. feramûş kirin 3. kavil kirin, hilweşandin, wêran kirin 4. genî kirin*"çi kir, bi destê xwe mala xwe xera kir" |
| **xerac** | xûgî, bac, kamçûr |
| **xeraf** | tora masiyan |
| **xerat** | dartiraş, necar *"ji xelqê re xerat e, ji xwe re malmîrat e" |
| **xerbazî** | laqirdiyên bi destan |
| **xerbend** | 1. dîl, hêsîr 2. girêdayî |
| **xerbende** | teqoze |
| **xerc** | mesref |
| **-ev îş xercê te ye** | ev kar sezayî/minasibî te ye |
| **-xerc û merc** | heys û beys |
| **xerc bûn** | lê mesref bûn |
| **xerc kirin** | mezaxtin |
| **Xerçeng** | Kelûya Kevjalê; Xermanan (21'ê Pûşperê-20'ê Tîrmehê) |
| **xerdel** | tovê rehekeke ku tê de bûjeneke şirîn, sext û sotîner heye |
| **xerêf** | spîtahiya ku piştî xewê di kortikên çavan de dimîne; zirîçka çêv |
| **xeriqandin/d ixeriqîne/ bixeriqîne** | 1. çilmisandin2. (reng) xera kirin3. tê de gut kirin 4. neheşî kirin |

| | |
|---|---|
| **xeriqîn/dixeriqe/bixeriqe** | 1. çilmisîn 2. (reng) xera bûn 3. tê de gut bûn 4. ji xwe ve çûn |
| **xeritandin/dixeritîne/bixeritîne** | 1. spîldax derbas kirin 2. ji ser ve parçeyek qut kirin |
| **xeritîn/dixerite/bixerite** | 1. spîldax derbas bûn2. ji ser ve parçeyek qut bûn |
| **xerîb** | 1. biyanî 2. bêgane |
| **xerîdar** | bikir, muşterî |
| **xerîte** | nexşe |
| **xerîtok** | hûr û mûrê ku ji ber darê qutkirî an jî darotî dimîne |
| **Xermanan** | Kelûya Kevjalê; Xerçeng |
| **xermaşe** | alaveke pênctilî ya ku pê giya zad tê berhevkirin |
| **xermişandin/dixermişîne/bixermişîne** | pencirûk kirin |
| **xerpişt** | pişteka alîkar a ku didine ber tiştekî ku zor lê hatiye |
| **xerte** | çandiniya ku bêyî şovhiştinê hatiye reşandin |
| **xerxere** | 1. dengê ku ji qirika kesê di ber sekeratê de tê 2. avwerdana li qirikê |
| **xerz** | 1. şitla ku êdî bûye dar 2. hêkên hûrik ên hin ajalan |
| **xerz kirin** | hêkên biçûçik kirin |
| **xes** | cureyekî çêreya pelpe raş e û nepijî tê xwarin; kaho |
| **xesandin/dixesîne/bixesîne** | 1. ji rewşa nêrtiyê derxistin, bêkêr û bêkîr kirin 2. ji mêraniyê xistin |
| **xesar** | ziyan û zirar |
| **xesifîn/dixesife/bixesife** | ji temtêlekî ber bi yeke jê kambaxtir ve daketin |
| **xesî/xesû** | xwesû |
| **xesîl** | raxistina nava malên gundan a ku ji cîl û cegên çedikin |
| **xesok** | kesê ku karê wî xesandina sewalan e |
| **xeşîl** | cureyekî çêreyê ye |
| **xeşîm** | xedar |
| **xeşîme** | 1. riya nepen 2. kulek, kunik |

| | |
|---|---|
| **xeşûm** | ecemî û tor |
| **xet** | 1. xêz 2. nivîs 3. riya ku tiştek tê re derbas dibe; guzergeh *“xeta |
| **xwar** | , di gayê pîr de ye” |
| **xeta** | karê çewt, xeletî |
| **xetakar** | kesê ku karên çewt didomîne |
| **xetat** | pîşekarê destnivîsên bedew |
| **xeter** | tehlûke |
| **xetere** | tirsa ziyandîtinê |
| **xeternak** | 1. bitehlûke 2. tirsnak |
| **xew** | paldan, razan *“xew û mirin, yek e” |
| **-xewê zor lê kirin** | ji ber bêxewiyê li ser xwe nesekinîn |
| **-xew lê herimîn** | ji ber xemekê ranezan |
| **xewar** | kesê ku xewa wî giran e, xilmaş |
| **xewas** | giregirekên civakê |
| **xewge** | textikê ku nivînên razanê li serê tên raxistin |
| **xewirîn/dixewire/bixewire** | 1. ji binî ve şewitîn2. tê de gut bûn |
| **xewle** | 1. cihê ku kesek lê tuneye 2. tenê 3. bixeter |
| **-xewle bûn** | 1. li cihekî tenê bi tena serê xwe man2. ketin silûkê |
| **-xewle kirin** | 1. hevpeyvîneke taybet kirin 2. (ji bo ku qeleşiyekê bîne sêrî) ji civakê bi dûr xistin |
| **xewlexane** | dêra silûkê |
| **xewn** | 1. ruya 2. nîgaş, xeyal*“ne li goristanan radikevim, ne jî xewnên xerab dibînim” |
| **-xewn dîtin** | di xewê de bûyerin dîtin |
| **xewneroşk** | xewnên di rewşa hişyariyê de |
| **xewtêş** | nexweşiya pirxewariyê |
| **-bi xewtêşê ketin** | bi nexweşiya pirxewariyê ketin |
| **xeyal** | nîgaş*“xeyala birçiyan, nan e” |
| **xeyalî** | nîgaşî |

| | |
|---|---|
| **xeyal kirin** | nîgaş kirin |
| **xeybet** | paşgotinî *“xeybet, li ba zarokan nabe” |
| **xeyd** | minet |
| **-xeyd ketin** | stûyan bûn berpirsiyarê pirsgirêkan |
| **xeydok** | suhatî |
| **xeyidandin/dixeyidîne/bixeyidîne** | sil kirin, bûn sedemkarê suhatina kesekî |
| **xeyidîn/dixeyide/bixeyide** | sil bûn, su hatin*“kêvroşk jî carinan ji çiyan dixeyidin” |
| **xeynî** | xeyrî, bilî |
| **xeyrî** | jê awarte ye |
| **-ji xeyrî te** | tu jê awarte yî |
| **xeyset** | xwî, xislet *“xeysetê nebaş, xezeba Xwedê ye” |
| **xezal** | bizina kovî; ask *“ji xezalê bezatir tune, ji risqê xwe pê ve naxwe” |
| **xezeb** | 1. rik 2. hêrs *“dilê bixezeb, mirovî nagihijîne mexsed û miradan” |
| **-lê hatin xezebê** | jê re rik û hêrsa xwe anîn |
| **xezne** | gencîne |
| **xeznik/xeznok** | qutiya biçûk a ku diravên hûr tê de tên civandin |
| **xezûr** | 1. (ji zavê re) bavê bûke 2. (ji bûkê re) bavê zavê *“xezûr, di şûna bavan de ne” |
| **xêl [I]** | xulek, kêlî |
| **-xêlek berê** | berî çend xulekan/ kêliyan |
| **xêl [II]** | govend |
| **xêlî** | mêzera ku davêjin ser serê bûkê û zava roja dawetê wê vedike *”dizê malê ji malê be, ga bi xêliyê dertê” |
| **xêr [I]** | na, nexêr |
| **xêr [II]** | 1. qencî û başî 2. sedeqe *“bi xêra seriyan, dixwe keriyek nan” |
| **-xêr kirin** | 1. bazar kirin2. qencî kirin 3. sedeqe dan |
| **xêr [III]** | teral, selexane |
| **xêrat** | sedeqe |

| | |
|---|---|
| **xêratxane** | 1. aşxaneya xêrxwazan a ku xwarinê li xizanan belav dike 2. êwirgeha kal û pîrên bêkes |
| **xêrîtî** | teralî, selexanetî |
| **xêrnexwaz** | 1. nebaş 2. xerabîxwaz |
| **xêv** | 1. hafize, bîr 2. hiş |
| **xêve** | mêwe û sewziyên ku di di serê demsalê de an jî derveyî demsalê hatine gihandin |
| **xêvet** | konikê biçûk î yekstûn |
| **xêvik** | 1. bîroke 2. kerose |
| **xêvzan** | kesê ku agehiyên pêşerojê ji xelqê re ve dibêje; falzan, remlavêj |
| **xêz** | 1. şopa zirav û dirêj; xet 2. şeklê ku ji meşandina xalekê pêk tê |
| **-xêza asoyî** | xeta ku bi berahî tê kişandin |
| **-xêza çemberî** | xeta nîgaşî ya ku bi berahî cîhanê di nîvî de dibire |
| **-xêza nedîtbar** | xeta ku bi çavan nayê dîtin an jî bi awayekî nîgaşî tê hesibandin |
| **-xêza stûnî** | xeta ku bi dirêjahî tê kişandin |
| **xêzefîlm** | fîlmên ku naveroka wan destxetî hatiye amadekirin |
| **xêzepehn** | xêza asoyî |
| **xêzerast** | xeta ku bê çiv û rasterast tê kişandin |
| **xêzexwar** | xeta berwar û qilç, hêlelar |
| **Xêzên Asimanî yên Kurdistanê(XAK) dezgehê** | raguhastina hewayî ya Kurdistanê |
| **xêzkar** | xetat, xetkêş |
| **xêz kirin** | xet kêşan |
| **xicîl kirin** | 1. mehcûb kirin2. dan şermê |
| **xiçviçandin/dixiçviçîne/bixiçviçîne** | karekî serobero pêk anîn, sixtopixto kirin |
| **xifş** | têjika karxezalê |
| **xiftan** | kinceke dirêj û sivik a ku berê di ser de dihate lixwekirin |
| **xij** | dengê tiştên ku bitews pêk tê; xiz |

| | |
|---|---|
| **-xij ajote ber** | erebe bilez/ bixiz kişande ber |
| **-xij derbas bûn** | qîj bihurîn |
| **xijik** | xizak, taxûk |
| **xijexij** | dengê kelîna avê |
| **xijexij kirin** | dengê kelînê ji ava li ser êgir hatin |
| **xijînî** | xijexij |
| **xijîjank** | 1. cihê xwedaxwişandina zarokan 2. pêpelûkên livok |
| **xij kirin** | (di zimanê zarokan de) şimitandin |
| **xil** | 1. girse 2. komeke tiştan |
| **xilindor** | şîrê pêşîn ê pez û dewarê zayî |
| **xilmaş** | xewar |
| **xilmet** | tiştê ku ne nû ye û berê jî hatiye bikaranîn |
| **xilole** | valahî |
| **xilole bûn** | di cihekî de valahiyek çêkirin |
| **xilole kirin** | di cihekî de valahiyek çêkirin |
| **xilopilo** | qulopilo |
| **xilorîk** | gijlok |
| **xilq** | kilîl |
| **xilqandin/dixilqîne/bixilqîne** | kilîl kirin |
| **xilqîn/dixilqe/bixilqe** | kilîl bûn |
| **xilt [I]** | 1. cureyekî heywanan e 2. xiniz *“xilt çi qasî xweliyê dikole, ewqasî di ser serê xwe de dike” |
| **xilt [II]** | 1. binemaya bêkêr2. binemaya gemarî 3. gildîn 4. tiştê bêbine |
| **xilt [III]** | cureyekî nexweşiyên çêrm e |
| **xilte** | torte, dûrd |
| **xiltopilto** | sixtopixto |
| **xilxal** | bazinê ku jin davêjine qeydikên piyên xwe |
| **xilxile** | 1. cihê pir bi kevir û zinar 2. tiştên li ser hev kombûyî |

| | |
|---|---|
| **-xilxileyek pez û dewar** | çend kerî pez û dewarên giran |
| **-xilxileyek leşker** | komeke leşkeran tevî çek û posatên wan |
| **ximav** | boyaxa nivîsanê; rengav, hibr |
| **ximavdank** | amana ku rengavê dikinê |
| **ximbil** | 1. pêlîstoka ku di dilqê mirov û heywanan de tê çêkirin û bi bendikan tê hereketkirin 2. kesê ku di bin bandora hinekan de dimîne |
| **ximxim** | kunên bêfilan |
| **ximximbeş**kesê | ku kunên bêvila wî vekirî ne |
| **xinav** | ximav |
| **xinamî** | kesên ku zewac di nava wan de çêbûne*"çav, xinamiyê xwe nas dike" |
| **xingilîn/dixingile/bixingile** | 1. (endamê şkestî an jî jicihderketî) pê de daliqîn 2. lingirî bi rê ve çûn 3. kulîn 4. xawûşe bûn |
| **xiniz** | 1. xayîn 2. qeleş |
| **xinzîr** | beraz *"çermê xinzîran nabe post, dijminê bavan nabe dost" |
| **xir** | endamê zayendî yê nêrzayan; kîr, terik |
| **xirecir** | 1. hêwirze, sûresat2. pevçûn 3. devjenî, pêşkarî |
| **xirek** | 1. sistbûyî 2. bêkêr3. teqozebûyî |
| **xirexir** | dengê gewriya kesê razayî |
| **xirexir kirin** | 1. (kesê razayî) di xewê de deng ji gewriyê hatin 2. (kesê di ber sekeratê de û sewala serjêkirî) êdî nefesên dawiyê dan |
| **xirêf** | torteya hingiv, doşav û hwd |
| **xirikîn/dixirike/bixirike** | 1. (pî) şimitîn 2. tehisîn |
| **xirindol** | şîrê pêşîn ê pez û dewarê zayî; xilindor |
| **xirink** | jina bedew a cazibedar |
| **xirî** | bûjeneke zeliqok a ku axlêveyan di çiqilên darên mêweyan de derdi keve û hem tê xwarin hem jî jê çesp tê çêkirin |
| **xirîn/xirînî** | xirexir |
| **xirmal** | kesê ku xwediyê jiyaneke têkûz e |

| | |
|---|---|
| **xirmişandin/ dixirmişîne/ bixirmişîne** | pencirûk kirin, bi nenîkan lê ba ketin |
| **xirmûşek** | quncirûk |
| **xirneq** | têjika kêvroşkê |
| **xirosk** | dîkil xiroş 1. coşî 2. şaşwazî |
| **xirpik** | di cendêk de raçînga vezen a ku bi karê hestiyî radibe |
| **xirp** | ji nişkê ve |
| **xirpe** | êrîşa komekê dijî kesekî tenê |
| **xirpo** | qûngiran, teral |
| **xirqe** | kinca pêşîvekîrî ya ku ji rîs an jî qumêş tê çêkirin û di ser de tê lixwekirin |
| **xirş** | giyanewera ku ji ber egerekê nikare avis bibe an jî ê ku nikare avis bike |
| **xirşî** | di giyaneweran de stewriya domdar |
| **xirtik** | cureyekî îsota ku hundirê wê bi goştê hêrandî, birinc an jî savarî tê tijîkirin û pehtin |
| **xirtol** | 1. hêwirze, sûresat2. komek |
| **xirxal** | 1. bazinên qeydikên piyan 2. tayeyên erebeyan |
| **xistin/dixîne /bixîne** | 1. avêtin erdê 2. ji xwe kirin3. winda kirin |
| **xişexiş** | dengê domdar ê kişîna tiştekî bi erdê re |
| **xişir** | 1. kevirê gewher, xeml 2. kevirên hûrik |
| **xişok** | ajala bêpê ya ku xwe bi erdê re dikişîne û wisa pêş ve diçe |
| **xişronek** | 1. pijikên ku di rûyê ciwanan de derdive2. pijikên ku di laşê soringî de derdikeve |
| **xişt [I]** | kaxetîta dîwarjenîn û banavakirinê; kerpîçê acûrî |
| **xişt [II]** | ji nişkê ve xuyabûna tiştekî |
| **-xişt derkete pêşiya me** | ji nişkê ve xuyayî me bû xiştek rastkêş |
| **-xişteka demê** | xanxanika ku demê nîşan dide |
| **xiştexişt** | dengê têvel û domdar ê şingeşingê |
| **xiştexişt kirin** | şingeşing kirin *“vê derê kire xiştexişt, çû dera han û kulê ew kuşt: gêzî (tiştonek)” |

| | |
|---|---|
| **xiştik** | 1. cureyekî nexweşiya pêz e 2. xiştxiştok3. amûra ku çimên tiştan bi hev ve dike; goşebend |
| **xiştxiştok** | pêlîstoka zaro kan a ku şingeşing dike |
| **xiştzeng** | şîşa ku serê wê tûj e |
| **xişûş** | şik û şubhe, înç |
| **xitêre** | meşaleya ku ji şiveke serqelaştî tê çêkirin û serê tê pêxistin |
| **xitimandin/dixitimîne/ bixitimîne** | 1. ser nixumandin2. dev girtin 3. pêşî lê girtin, asteng kirin |
| **xitimîn/dixitime/bixitime** | 1. ser nixumîn 2. fetisîn |
| **xiyanet** | xaynetî |
| **xiyar** | cureyekî sewziyan e û nepijî tê xwarin |
| **xiz [I]** | kaya girs |
| **xiz [II]** | tews, lezgînî |
| **-xiz girtin** | lezgin bûn |
| **-xiz dan** | lezgîn kirin |
| **xizak** | navgîneke bêtaye ya ku bi şimatandinê tê ajotin |
| **xizan** | 1. feqîr 2. belengaz*“xizan e, riya xwe nizane” |
| **xizane** | dolaba kincan |
| **xizanî** | 1. feqîrtî 2. belengazî*“xizanî, zingara mêran e” |
| **xizêm** | xemla jinan a ku di bêfilên xwe de dadiliqînin |
| **xizêmok** | 1. cureyekî kulîlkan e 2. tiştê herî tehl î ku tê bîra mirovî |
| **xizinde** | xişok |
| **xizm** | eqreba |
| **xîç** | 1. kevirên hûrkanêk; xişir 2. xêz |
| **xîçkêş** | rastkêş |
| **xîge** | hebana avê ya rêwîtiyê |
| **xîlaf** | dijber |
| **-xîlafî rastiyê ye** | dijberî rastiyê ye |
| **xîj** | dengê şimitîn û rûxînê yî bilez |
| **-xîj rûxîn** | pir zû hilweşîn |

| | |
|---|---|
| **xîjexîj** | dengê domdar ê şimitînê |
| **-xîjexîja xizakan guhê me bir** | dengê şiqitîna taxûkan em aciz kirin |
| **-xîjexîj kirin** | vij derbas bûn |
| **xîjik** | taxûk, tazûg |
| **xîlok** | kevirên biçûk; hoçik |
| **xîret** | 1. namûs 2. rûmet3. xebat *“xîreta kê tunebe, îmana wî jî tuneye” |
| **xîretkêş** | xwedanrûmet |
| **xîz** | kevirên hûrik ên wekî xweliyê; sîlik, sêlax, rîk |
| **xîzek** | cihê ku xweliya wê ji sêlaxê pêk tê |
| **xîzexîz** | dengê ku ji ber zedegirtina pişikê tê pê |
| **xîzexîz kirin** | deng ji qefesê hatin |
| **xîzîn** | xîzek |
| **xîzînî** | xîzexîz |
| **xîzok** | cureyekî nexweşiya tengenefesiyê ye; fetsonek |
| **xîzokî** | kesê ku bi nexweşiya tengenefesiyê ketiye; fetsonekî |
| **xîzar** | cureyekî makîneya birînê ye |
| **xîzistan** | çol, sehra |
| **xoce** | 1. mamoste 2. seyda |
| **xof** | 1. tirs 2. saw, sehm |
| **xonçe** | 1. bişkov 2. textikê nanpehtinê yî wekî sifreyê jî tê bikaranîn 3. bexşîşa dawetkirin û sinetbûnê |
| **xone** | pisîkê nêr |
| **xongîn** | barişa baranê ya dêjnijkî |
| **xopan** | 1. wêran 2. xerabe, kavilbûyî |
| **xorav** | bastêqê mêweyan î ku bi şêkir hatiye şirînkirin |
| **xore** | giyanewereke yekşaneyî ya ku dibe sedema nexweşiyan û bi çavan nayê dîtin |
| **xorînî** | dengê domdar ê kesê razayî; xirexir |
| **xort** | temenê mêran ê ji sebîtiyê heta navsaletiyê(16-35) *“xort heta ku bi xwe nehesin, wekî varikan dimeşin” |
| **xortanî** | ji bo mêran temenê ku di navbeyna16-35’an de ye |
| **xortik** | têjika kîvroşkê |

| | |
|---|---|
| **xortim** | lûleya nermik a ku ji hilberînên niftê hatiye çekirin |
| **xox** | cureyekî mêweyan e*“xox ne dar e, qîz ne war e” |
| **xozan** | zeviya ku salek berê hatiye çandin û îsal jî nehatiye şovkirin |
| **xubar** | xumama xwelî û xîzê |
| **xudmuxtarî** | rêvebiriya nîvserbixwe ya ku di karên derve de li gor rêvebiriya navendî tev digere |
| **xulam** | 1. bende 2. berdestiyê mêr *“axa bi xulam e, xulam bi olam e” |
| **xulamî kirin** | 1. bendetî kirin 2. berdestîtî kirin*“Emerê çelengdar, xulamî kir ji hakimî re sî û sê salan, lê tu carî ji mêrê hakim nekir bawer û îhtîbar” |
| **xulav** | arî |
| **xulavî** | di rengê ariyê de |
| **xulp** | 1. çewt 2. nerasterast3. dererê 4. xwar |
| **xulpî** | 1. xwarî 2. çewtî 3. biziqzaq 4. nelirêtî |
| **xultexult** | dengê ava ku binerd dibe an jî di lûleyekî de serejêrî erdê dibe |
| **xultexult kirin** | (av) di dema rijînê de deng dan |
| **xumal** | kesê ku karên mala xwe bi xwe bi cih tîne; xwediyê malê, malxwe |
| **xumalî** | 1. kinca ku li gor xwestina bikirî tê dirûtin2. rastmala giranbiha ya ku binirxtirbûna wê pêkan e |
| **xumam** | 1. hilm û gilm 2. talaz |
| **xumirîn/dixumire/bixumire** | (mêwe) sor bûn û stewîn |
| **xumrî** | rengê di navbeyna sor û reş de |
| **xunav [I]** | çilikên baranê; dêjnij |
| **xunav [II]** | aviya ku sibehan li ser belçikan peyde dibe |
| **xundor** | xirindol |
| **xunivîn/dixunive/bixunive** | dêjnijên baranê avêtin |
| **xur [I]** | 1. xurek, xwarin 2. par, behre *“kerê pir-bibez, bû xurê guran” |
| **-xur [II]** | paşgireke ku xwarinê dinimîne |
| **xura** | cemser |
| **xurc** | têrika ku wekî xalîçeyan hatiye raçandin |

| | |
|---|---|
| **xurcezîn** | têrika ku davêjin terkiya zînê hespan |
| **xurcik** | têrika biçûk |
| **xurek** | 1. tiştên xwarinê yên ku hatine pijandin2. xiza |
| **xurekpêj** | aşpêş |
| **xurekxane** | xwarinxane |
| **xurifî** | kesê ku ji ser hişê xwe çûye |
| **xurifîn/dixurife/bixurife** | hiş tev li hev kirin |
| **xurimîn/dixurime/bixurime** | 1. peritîn 2. rizîn |
| **xurî** | pijikeke girs a ku bi qasî nokekî mezin dibe, piştî peqînê pûç dibe û şopa wê di çêrmî de dimîne |
| **xurîn** | kesê ku ji sibehê de tiştek nexwariye |
| **xurînî** | danê xwarinê yî beriya taştê |
| **xurme** | mêweyeke erdên germ e; qesp |
| **xurnûk** | cureyekî çêreya ku striyên wê pir in |
| **-xurnûk ketin** | qûnê pir aciz bûn û di cihê xwe de netebitîn |
| **xurom** | gurzê girênedayî |
| **xurom kirin** | negirêdayî gurz kirin |
| **Xuroş** | fûriyayî |
| **xuroş bûn** | fûrîn |
| **xurt** | 1. bihêz 2. bitaqet 3. şidiyayî 4.muhkem *“ava xurt, serevraz jî diçe” |
| **xurt bûn** | 1. bi hêz bûn 2. şidîn û muhkem bûn |
| **xurt kirin** | 1. bi hêz kirin2. şidandin û muhkem kirin |
| **xusar** | xunaveke ku dişibi he xwêyê û piştî ku rûyê erdê spî dike dihele |
| **xuşkî** | bişkulên hişk ên binê guheran |
| **xuştire** | 1. amana aşpêjan a ku pê sewziyên wekî xiyar, tivir, gizêr û hwd hûr hûr dikin 2. alava xeratan a ku pê daran dadirojin û meht dikin |
| **xuya** | 1. diyar 2. kifş 3. eşkere*“ava zelal, tê de xuya ye xem û xeyal” |
| **xuya bûn** | 1. diyar bûn 2. kifş bûn 3. eşkere bûn |
| **xuya kirin** | 1. diyar kirin2. kifş kirin 3. eşkere kirin |
| **xûde** | serdankeke cengî ya ku ji derbên fîşengan diparêze |

| | |
|---|---|
| **xûk** | bac û cezayê mîrî |
| **xûgî** | baca bi zorê; xerac |
| **xûj** | dengê rûxînê |
| **xûjexûj** | dengê hilweşînê yî domdar |
| **xûjî** | ser bûn 1. zû xwarî ser bûn 2. êrîş birin ser |
| **xûjal** | 1. jîr, jêhatî 2. bextewar |
| **xûrexûr** | dengê ava lehiyê |
| **xûsik** | qiravî |
| **xûz** | pişthotik |
| **xûz bûn** | 1. (pişt) hotik bûn2. (serî) nizm bûn |
| **xûz kirin** | 1. (pişt) hotik kirin2. (serî) nizm kirin |
| **xwan [I]** | serwer, hukimdar |
| **xwan [II]** | sifre *“dil ne xwan e ku mirov li ber hemî kesî veke” |
| **xwan [III]** | xuya, diyar*“quzê gewr di derpê re xwanêye” |
| **xwar** | 1. ne rast û durist 2. teqoze 3. çewt 4. jêr 5. xulp *“aqilê kêm riya xwar ber bi hevalê xwe dixe” |
| **xwarin [I]** | 1. xurek 2. xiza*“li şeran xal û xwar-zî, li xwarinan mam û birazî” |
| **-xwarinên parastî** | xwarinên ku bi dermanên têkildar temenê bikaranîna wan tê dirêjkirin |
| **xwarin/dixwe/bixwe [II]** | qurt kirin, daqurtandin*“peza bi tenê, guran xwariye” |
| **xwaringeh** | cihê ku xurek lê tê çêkirin û firotin |
| **xwarî** | 1. xulpî 2. çewtî 3. neduristî *“ew mala ku te nanê wê xwariye, bi xwarî lê menêre” |
| **xwarzê** | keça xweha mirovî xwarzî kurê xwişka mirovî*“ap bi biraziyan, xal bi xwarziyan re dikin” |
| **xwazgîn** | kesê ku daxwaza zewaca mêrekî digihîne malbata jinekê |
| **xwazgînî** | navberkariya malbatên keç û xortên berzewac |
| **xwe [I]** | zat, şexs, kesayet*“xwe tevî kar nekî, kar nameşe” |
| **xwe [II]** | cînavka vegerok |
| **xwe [III]** | pêşgir, navgir û paşgira ku wateya xweseriyê dide peyva hevedudanî mînak: xwebar, jixweber, malxwe... |
| **xweajo** | paldêra hundirîn |

| | |
|---|---|
| **xwe badan** | xwe dan aliyekî |
| **xwebar** | makîneya ku xwe bi xwe dixebite; xweger |
| **xwebawer** | arxweyîn |
| **xwe bi xwe** | bêyî niçandin û alîkariya kesekî din |
| **xwecihî** | 1. herêmî 2. deverî |
| **Xwedan [I]** | Xwedê, Yezdan*"bêyî emrê Xwedan, pel ji darê naweşe" |
| **xwedan [II]** | xwedî, sexbêr, hemal |
| **-xwedanmaliya arizî** | milkiyeta aîdî kesan |
| **-xwedansoz** | kesê ku biryarek li ser nefsa xwe biriye û heta dawiyê jî li serê dimîne |
| **xwe dan ber** | biryara kirina karekî dan |
| **xwedawend** | yezdanoka mê ya ku pûtparêz jê re perestişê dikin |
| **Xwedê** | çêkiroxê hemû afirandiyan; Yezdan *"mêvan, mêvanê Xwedê ye" |
| **-Xwedê dan** | hatin cîhanê xwedênenas 1. bêxwedê2. bêîman |
| **xwedî** | 1. sahib, sexbêr 2. hemalê aîdiyetê *"bêndera derengmayî, nabe xurê xwedî" |
| **xwedî kirin** | 1. mezin kirin2. dermal kirin 3. sexbêr kirin *"berxa ku Xwedê ew xwedî kir, guran jî nekuşt" |
| **xwedîtî** | 1. sahibtî, sexbêrî2. hemalî |
| **xwefiroş** | 1. xayîn 2. sîxur |
| **xwedîgiramî** | 1. xwedanqedr2. xwedanrûmet |
| **xwedîgiravî** | 1. qaşo 2. bêbine |
| **xweger** | xwebar |
| **xwe girêdan** | 1. kinc li xwe kirin 2. rext avêtin navmila xwe 3. amadeyî karekî bûn |
| **xweh** | xwişk |
| **xwe hilkutan** | xwe gijgijandin |
| **xwekujî** | întihar |
| **xwelî** | ax, xak *"agir xweş e, lê xwelî jî jê çêdibe" |
| **xwelîdank** | kasika cixarekêşan a ku ariya cixareyên xwe dirijînînê |
| **xwende** | 1. kesê ku pisporê nivîsan e û fêrî zanînan bûye 2. rewşenbîr |
| **xwendegeh** | 1. dibistan 2. saziyên perwerdehiyê |
| **xwendekar** | şagirt |

| | |
|---|---|
| **xwendevan** | kesê ku nivîsan dişopîne |
| **xwendin/dixwîne/bixwîne** | 1. ji nivîsê fêm kirin û şopandin 2. di dibistanekî de perwerde bûn *“bila bixwenda, paşê bigota” |
| **-xwendin û nivîsandin** | sewad |
| **xwendingeh** | dibistan |
| **xweng** | xwişk |
| **xweperest** | 1. nefsperest, nefsanî 2. ezperest, ezezok |
| **xwe pesartin** | xwe spartin |
| **xwe pêçan** | tiştek li xwe alandin |
| **xwe pêşandan** | bertek nîşandan |
| **xwepêşandêr** | kesê ku ji ber rewşeke baş an jî nebaş berteka xwe nîşan dide |
| **xwe pê ve berdan** | 1. mubtela bûn 2. tê alîn3. pê bilîn |
| **xwe pê xweş kirin** | laloşî û melaqî kirin |
| **xwe rast/rasteve kirin** | 1. piştî xwarbûnê pişta xwe rast kirin 2. piştî mijûlahiyê karê xwe gihandin hev 3. piştî tengasiyê derketin serfiraziyê |
| **xwerenedîtî** | teralê Bexdayê |
| **xwerexneyî** | rewşa mirov bi xwe tenqîda nefsa xwe bike |
| **xwerist** | xweza, sirûşt |
| **xwermend** | rêvebirî |
| **xwerû** | saf, sade |
| **xweser** | ne bi ser tiştekî ve ne jî bi kesekî ve girêdayî, serbixwe. |
| **-xweserî wî ye** | taybetiyeke wî ya aîdî wî tenê ye |
| **xweserîtî** | 1. xudmuxtarî2. serbixwetî |
| **xwesî** | 1. pêxas, pêrût 2. çeqrût |
| **xwe spartin** | 1. penaber bûn 2. teslîm bûn, xwe radestî yekî kirin |
| **xwestek** | 1. daxwaz 2. mirad |

| | |
|---|---|
| **xwestin/dixwaze/bixwaze** | 1. daxwaz kirin 2. mirad kirin 3. teteb kirin*"ka kî dixwaze ku xelqê li xwe ar û mar bike?" |
| **xwestî** | 1. keça ku ji malabavana wê hatiye xwestin2. xwedîdildar *"ava xwestî, naçe hêstî" |
| **xwesû** | 1. ji bûkê re diya zavê 2. ji zavê re diya bûkê |
| **xweş [I]** | 1. baş 2. çê 3. qenc 4. rind |
| **xweş [II]** | 1. biçêj 2. bitahm*"kerê reş, dixwe tiştê xweş" |
| **xweşa** | kesê ku xwe nas dike û ji temtêla xwe jî razî ye |
| **xweşav** | ava qax û mêwijên kelandî û şirînkirî |
| **xweşawaz** | dengxweş |
| **xweşbîn** | çakbîn |
| **xweşbînî** | çakbînî |
| **xweş bûn** | 1. biçêj bûn 2. bitahm bûn 3. qenc bûn4. rind bûn 5. baş bûn*"heta nava destan reş nebe, tahma devan jî xweş nabe" |
| **xweşendam** | kesê ku xwediyê bejn û baleke xweşik e |
| **xweşewîst** | 1. delal 2. birêz |
| **xweşhal** | ji rewşa xwe razî |
| **xweşhalî** | rewşa razîbûnê |
| **xweşik** | rindik, delalik |
| **xweşî** | 1. naziktî 2. silametî |
| **xweş kirin** | 1. biçêj kirin2. bitahm kirin 3. qenc kirin 4. rind kirin 5. baş kirin *"kes dilê xwe li miriyan xweş nake" |
| **xweşmêr** | camêr |
| **xweşnûd** | razî |
| **xweşnûdî** | razîtî |
| **xweşok** | serşok |
| **xweşrû** | rûpak û bedew |
| **xweştivî** | yar, dildar |
| **xweşxwaz** | ristên pa û pesndanê yên ji bo kesekî hêja |
| **xwe vedizîn** | 1. xwe veşartin2. fizirîn |
| **xweyî** | xwedî *"ji bo xatirê xweyî, mirov kevir navêje seyî" |
| **xweza** | 1. sirûşt, tebîet 2. xeyset, xislet |

| | |
|---|---|
| **xwezayî** | 1. sirûştî 2. jixweber |
| **xwezan** | hozan |
| **xwezik** | daxwazên ku pêkhatina wan pir dûr e |
| **xwezî [I]** | 1. xwezil 2. daxwaza nîgaşî *“sal bi sal, xwezî bi par” |
| **xwezî [II]** | şilahiya qirikê; tif |
| **xwê** | 1. kevirê şor ê hêrandî yê ku tevî xurek dikin û şorahiyê didê 2. şilahiya ku piştî westîn û hwd ji lêş der tê *“dema ku heywan bê xwê bimînin, keviran dialêsin” |
| **xwê dan** | (Ji ber herareta lêş) term şil bûn |
| **xwêdank** | derdana ku xwê dikinê |
| **xwêdîn** | sel û kevirên ku xwê li ser direşînin da ku pez û dewar bên û bialêsin; sûrdîn |
| **xwêlîn** | kana xwêyê xwir girê ku di canê giyaneweran de peyde dibe |
| **xwirandin/dixwirîne/bixwirîne** | 1. gir [kestandin2. niçandin û nav tê dan *“birîna xwe bi xwe nexwirînî, rehet nabî” |
| **xwişexwiş** | dengê bilind ê daherikîna avê |
| **xwişîn/dixwişe/bixwişe** | deng ji herka avê hatin |
| **xwişk** | keça bavê mirovî; xweng, xweh |
| **xwî** | 1. serinc 2. xislet 3. tevger |
| **xwîn** | 1. aviya sor a ku di rehan de diçe û tê 2. ava jiyanê ya giyaneweran*“xwîn, bi xwînê nayê şûştin” |
| **-xwîn jê hatin** | (ava sor a rehan) derhatin *“ji paniyê xwîn nayê ku dil lê bişewite” |
| **xwînbir** | dermanê ku nahêle xwîna birînê zêde bikişe |
| **xwîndar** | mêrkuj *“deyndaran, xwe avêtin pişt xwîndaran” |
| **xwîngerm** | 1. şirîn 2. xwoşewîst |
| **xwînsar** | 1. rûsar 2. dilkevir |
| **xwînxwar** | 1. zalim 2. sitemkar3. xwînmij *“beg timî xwînxwar in” |

# Y

| | |
|---|---|
| **y/Y** | tîpa sihemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê pêşezmandevî ye, di belavbûna wê de ziman li ser diranan dişide û nîvdengdêr e |
| **ya** | baneşana gazîkirinê; î |
| **-ya Xwedawo** | î Xwedawo |
| **yabo/ yadê** | bavo!/dayê! |
| **yadîgar** | 1. diyarî 2. bîrewerî |
| **yad kirin** | bi bîr anîn |
| **yaho** | î filankeso |
| **yan** | cureyekî sendeliyên fireh e û vedigere nivîneke razanê jî |
| **yane** | cihê aîdî komeke taybet; bingeh, navend |
| **-yaneya torevanan** | navenda edebiyatzanan |
| **yanzdeh** | yazdeh |
| **yar** | 1. dost 2. hevalbend3. hezkirî *“Xwedê yar be, bila şûr dar be” |
| **yarî** | 1. dostî 2. laqirdî |
| **yarîgeh** | qada lîstik û şahiyê |
| **yarîker** | 1. nemûşkar 2. lîstikvan 3. tinazekar |
| **yarî kirin** | 1. lîstin 2. henek kirin |
| **yarkok** | gizêr |
| **yarmasî** | cureyekî masiyan e |
| **yarmetî** | 1. alîkarî 2. destek |
| **yawe** | gotara beletewş |
| **yax** | 1. eware 2. jar û lawaz3. bêbine |
| **-yax hesibandin** | qîma xwe pê neanîn |
| **yaxir** | 1. hendef 2. kendal |
| **yazdeh** | 1. hejmara piştî dehan û beriya duwazdehan2. jimareya 11’an *"yazdehê hezîranê, berî bide zivistanê" |
| **yek** | 1. jimareya 1’ê 2. hejmara |

| | |
|---|---|
| **yekemîn** | a jimartinê2. kes *“mêvanê yekî, mêvanê gundekî” |
| **yek bûn** | 1. pevre bûn 2. tenê bûn |
| **yekcar** | 1. bi carekî tenê2. bi giştî, bi komasî |
| **yekcure** | ji heman celebî |
| **yekçav** | xwediyê çavekî tenê |
| **yekdemî** | di heman demê de |
| **-êrîşa yekdemî** | êrîşa di heman demê de û li çend cihan |
| **yekdeng** | dengê ku di carekê de ji dêv belav dibe |
| **yekdengî** | axaftina bi awayekî ku tu dibêjî qey kesek tenê diaxive |
| **yekdengîtî** | axaftina komekî bi heman peyv an naverokê |
| **yekdevî** | biryardana li ser axaftinekê |
| **yeke** | pîvan û qeysa tiştan |
| **yekedeng** | awayê belavbûna peyvê |
| **yekem(-în)** | di rêza pêşin de; pêşîn |
| **yekemî/yekemîntî** | di rêzê de pêşîntî; ewiltî |
| **yekgirtî** | bi awayekî ku ji hev ne cihê |
| **yekjimar** | ne bi komekî û pirjimar |
| **yekitî** | 1. wehdet 2. tenêtî*“kuderê yekitî, wê derê rizq” |
| **yekîne** | desteyeke leşkerî |
| **yek kirin** | 1. gihandin hev2. kom kirin |
| **yekneseq** | tevgera ku tu carî dirûvê xwe naguhere |
| **yekpare** | gişt, hemû |
| **yekreng** | yekcure |
| **yeksan** | du an jî çend tiştên mînanî hev; wekhev |
| **yeksanî** | şibihîna tiştekî bi tiştekî din; wekhevî |
| **yekser** | 1. pê re 2. hema niha; rasterast |
| **yekşem** | roja duyemîn a hefteyê |
| **yekta** | 1. bêhevta 2. bêmînak |
| **Yelda** | roja herî dirêj a salê; 21’ê Berfanbarê |
| **yendo** | qasika biçembil |

| | |
|---|---|
| **yeqîn** | 1. bawerî 2. qinaet |
| **yeqîn kirin** | 1. bawerî pê anîn 2. qinaeta xwe pê anîn |
| **yewmiye** | heqdesta rojekê |
| **yexsîr** | hêsîr, dîl |
| **yexte** | exte |
| **yextirme** | extirme |
| **Yezdan** | Xwedê |
| **yezdanok** | 1. sefêkê ku wekî ku Xwedê ye tevdigere2. pût |
| **yêz** | sewalê bêkêr û lawaz |
| **yêzî** | bêkêrtî û lawaziya sewalan |
| **yom** | qudûş |

# Z

| | |
|---|---|
| **Z/z** | tîpa sih û yekemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê diranî ye û awayê belavbûna wê fîzek û nerm e |
| **zaboq** | 1. zibilgeh 2. mezbele |
| **zad** | 1. dexl 2. mehsûl |
| **-zad hilanîn** | dexl û mehsûlê salê berhev kirin |
| **zadegan** | koma torinan |
| **zadeganî** | aderî, torinî |
| **zag** | di çiyan de rêzezinarên asê |
| **zagon** | qanûn |
| **-zagona bingehîn** | qanûna esasî |
| **-zagonên xwezayê** | qanûnên xweristê |
| **zagonsazî** | danêriya qanûnan |
| **zal ve kirin** | tiştê teqlîde û sexte kirin |
| **zamok** | 1. rêhesin 2. mirovê ku hem xurt û zexm e hem jî bi dest û pê ye |
| **zan** | zayîn |
| **zana** | 1. arif, pispor 2. hişmend |
| **zanav** | pênasa neteweyî, olî û hwd |
| **zanist** | îlm *“zanist, nayê talankirin” |
| **zanistî** | îlmî |
| **zanîn/dizane /bizane** | 1. pê beled bûn 2. têgihiştin3. pê derxistin 4. nasîn*“av dizane di bin wê de çi heye” |
| **zanîngeh** | saziya perwerdehiyê ya piştî dibistana amadehiyê |
| **zanko** | zanîngeh |
| **zanyar** | 1. alim 2. pisporê têgihiştî |
| **zanyarî** | 1. alimtî 2. pisportî |
| **-bingeha zanyariyê** | di malperê de cihê ku agehî tê de ne |
| **zar** | ziman *“berû, zarê bizinê ye” |

| | |
|---|---|
| **-zar û zêç** | zarok û kulfet |
| **-zar û ziman** | axaftin û derbirin *“bi bûkê re nîn e zar û ziman, bi xesûyê re nîn e dîn û îman” |
| **zarava** | devokên heman zimanî; lehce |
| **zarbêj** | axivgerê li pêşberî komeke mirovan |
| **zarezar** | lavayî |
| **zarezar kirin** | lavayî kirin |
| **zargotin** | gelêr |
| **zarî kirin** | teqlîd kirin |
| **zarîn/dizare/ bizare** | 1. nalîn 2. lavayî kirin |
| **zarok** | kur û keçên ku ji têkiliya zayendî ya du mirovan tên dinyayê *“zarok, bi ketin û rabûnê mezin dibin” |
| **-zarokan dor lê girtin** | bûn xwediyê gelek zar û zêçan |
| **zarokatî** | temenê însên ê heta duwazdeh saliniyê |
| **zarokxane** | cihê ku lê keç û kurên 4-6 salî tên perwerdekirin |
| **zarxweş** | zimanşirîn, zarşirîn |
| **zat** | kesayet |
| **zav** | mezheb |
| **zava** | hevserê bûkê *“bûk bi dilê zavê ye, çi kul bi dilê xelqê ye” |
| **zavare** | xebata bi karbeşiyê |
| **Zawe** | gerestêrkek e |
| **zax [I]** | madenek e |
| **-zax kirin** | bi madenê zaxê şil kirin |
| **zax [II]** | xêz, xet |
| **-zax kirin** | xêz kirin |
| **zaxe** | pirçî |
| **zaxor** | hevrazê bi kevir û kuçik |
| **zaxorî** | hêratiya hevrişimî |
| **zayend** | 1. cinsiyeta heyberan2. mêzatî, nêrzatî û bêhêliya peyvan 3. nifş |
| **zayendî** | cinsî |
| **zayendîtî** | cinsîtî |

| | |
|---|---|
| **zayîn/dizê/bizê** | 1. (sewalê) têjik anîn 2. (tiştê avî) kişîn û li hev zêde bûn *“bila bizê, nêr û mê ferq nake” |
| **zeb** | 1. hişk 2. sext 3. zexm |
| **zebanî** | peywirdarê dojehê |
| **zeber** | xwendina tîpeke erebî bi/î/yê |
| **zebeş** | cureyekî berên bîstên e û nepijî tê xwarin; petêx *“zebeş ji xwarinê re, dendik ji danînê re” |
| **-zebeşek diçe dêv** | ji kêfan zikopişto dikene û devê wî nayê ser hev |
| **zebloq** | meht û tenik |
| **zeblot** | rûdiyê stûr |
| **zebûn** | 1. jar, hejar 2. belengaz |
| **Zebûr** | pirtûka îlahî ya ku ji Cn. Dawid eleyhiselam re hatiye hinartin |
| **zecr** | azar û renc |
| **zecirandin/dizecirîne/bizecirîne** | azirandin û rencandin |
| **zede** | 1. herş 2. ziyan |
| **-zede girtin** | 1. herişîn 2. ziyan dîtin |
| **-zede lê xistin** | 1. herişandin2. ziyan û xesar dan |
| **zeft** | şiyan, pêkarîn |
| **-di zefta min de ye** | ez pê dikarim û ev tişt bi qasî hêza min e |
| **zeftî** | di artêşê de hêza leşkerî ya ku ewlehiya civakî û bicihanîna fermanên rêvebiriyê dipê |
| **zeft kirin** | 1. bi dest xistin2. girtin 3. ba lê anîn*“du zebeş, bi destekî nayên zeftkirin” |
| **zehar** | elewat |
| **zehf** | 1. pir, zêde 2. xelî*“dara ku zehf mewij anî, serê xwe berjêr dike” |
| **zehf bûn** | 1. pir bûn, zêde bûn 2. xelî bûn |
| **zehmet** | zorî *“xerakirin rehet e, avakirin zehmet e” |
| **-zehmet kişandin** | zûrî û zecr dîtin |
| **zekem** | çilmasî, bahor |

| | |
|---|---|
| **zekemî** | kesê ku bi çilmasiyê ketiye; bahorî |
| **zelal** | 1. tenik 2. şefaf 3. saf 4. ne şêlî *“ava zêlal, jina delal” |
| **zelal bûn** | 1. şefaf bûn 2. şêlîtî tê de neman *“av heta girav nebe zelal nabe” |
| **zeliqandin/di zeliqîne/ bizeliqîne** | 1. pê ve bestin2. pêve kirin 3. zemq kirin |
| **zeliqîn/dizeli qe/bizeliqe** | 1. bestin 2. pêve bûn3. pê ve zemq bûn *"gûyê hişk, bi merivan ve nazeliqe” |
| **zeliqok** | çesp, zemq |
| **zelîl** | 1. hureme, heqîr 2. bêkêr |
| **zelûl** | bêkesayet û bêkêr |
| **zelût** | keçel, qafrût, serût |
| **zem** | rexne |
| **zeman** | dem *"zeman, wek kela şîr e" |
| **zemawend** | dawet, dîlan |
| **zembelîk** | qeşaya ku bi kêlekên banan ve ber bi jêr dadilqe; lîlik, sivink, sîvander |
| **zembîl** | sebet, selik *“kar, di bin zembîlê de namînin” |
| **zembûr** | cehterî/catir |
| **zem kirin** | 1. bi awayekî neyînî rexne kirin 2. sox kirin |
| **zemîn** | zevîn |
| **zenbele** | pergala ku kêş û miçiqandina ava lûleyan mîheng dike; pilûsk |
| **zend** | ji enîşkê heta qeydika dêst; milê jêrîn |
| **-zend hilkirin** | xwe ji şer an jî karekî re amade kirin |
| **zendik** | xemlên ji bo qeydika destî |
| **zeng** | rengê qehweyî ê ku xwe davêje hêsin; her ku tîr dibe werdigere reşahiyeke stûr û hêsin dirizîne; jeng *“zêr, zengê nagire” |
| **-zenga dilê xwe rêtin** | hêrs û tola dilê avêtin der ve |
| **-zenga mirinê lê ketin** | zer bûn û zibilîn |
| **zengarî** | jengarî |
| **zengar girtin** | jengar girtin |
| **zengelok** | zengilor |

| | |
|---|---|
| **zengil** | amûreke lajwerdî ya ku di hundirê wê de parçeyek lajwerdê daliqandî heye û gava li ba dibe dengekî derdixe; naqos, çangoçk |
| **-zengila gêrebayî** | naqosa biçûk a ku bi gêrebayê dixebite û bi kêrî hişyarkirinê tê |
| **zengilor** | xirtxirtûk, qirik, gewrî |
| **zengî/zengo** | 1. di zînan de şûna pê 2. reşik, zencî *“hespê çê, zengiyan nagihêjîne hev” |
| **zenî** | erzên |
| **zeqnepûr** | dareke dojehê ya jehrdar e; ziqûm |
| **zer** | 1. qîçik 2. rengê zêrî*“ê ku dixwe gebola |
| **zerî** | , ew diçe devê derî” |
| **zeraq** | tîrojên tavê; zerekî |
| **zerav** | kêma amasê; nêm |
| **zerbaf** | qumaş an pîneyê ku tayên zêrîn jî tev de hene |
| **zerd** | 1. gir 2. kêrt |
| **zerdik** | parçeyê zer ê di nava spîtka hêkê de |
| **zerdalû** | arûng |
| **zerekî** | tîrojên tavê |
| **zerengî** | qabiliyet |
| **zerf** | namedank |
| **zerg** | nikê riman ê tûj |
| **zerhimandin /dizerhimîne / bizerhimîne** | 1. reng lê zer û qîçik kirin2. çilmisandin û bizdandin |
| **zerhimîn/diz erhime/bizer hime**1 | . zer bûn û çilmisîn 2. gewrotankî bûn û bizdîn |
| **zerik** | cureyekî nexweşiyê ye |
| **zerî** | 1. kej 2. çûr a bedew |
| **zerîle** | cureyekî çivîkên xweşawaz e |
| **zerîpoş** | navgîna bi mertal |
| **zerk kirin** | zerq kirin |
| **zernik** | cureyekî çêreyê ye |
| **zernîx** | pirçhildana bi bendekî pir badayî |

| | |
|---|---|
| **zerpiçîn/dizerpiçe/bizerpiçe** | spîçolkî bûn |
| **zerq** | bi şiringeyê valakirina dermanê avkî li bin çêrmî |
| **zerq kirin** | bi şiringeyê derman valayî bin çêrmî kirin |
| **zerya** | behr, derya |
| **zerzaniq** | qirneqos, texterewan |
| **zerzewat** | sewzî |
| **zerzewatfiroş** | kesê ku sewziyan difroşe |
| **zever** | 1. vejen 2. wize |
| **zevî** | cihê ku çandinî lê tê kirin *“baran dibare ji xwediyê zeviyê re kar e” |
| **zevîn** | rûyê erdê |
| **zevîn-nasî** | zanistên têkildarî qalikê rûyê erdê |
| **zewac** | mehrkirin, nikah*“zewaca bêdil, ezabê vê dinê ye” |
| **zewade** | . erzaq 2. debar3. êwran, hevran |
| **zewandin/dizewîne/bizewîne** | (di dema zayîna sewalê de) têjik jê kaş kirin û dan mêtin |
| **zewd** | karê nanoziko yê ku kesên bêgav dikin |
| **zewicandin/dizewicîne/bizewicîne** | (jinek li mêrekî) nikah kirin |
| **zewicî** | xwediyê mal û eyalekê |
| **zewicîn/dizewice/bizewice** | bi jinekî re kebîn kirin *“bi dilê mezinan bizewice, bi dilê biçûkan hez bike” |
| **zewq** | feraseta bijartina delalî û kirêtiyê |
| **zexel** | 1. teral 2. sersar 3. xayîn *“gayê zexel e, timî li mexel e” |
| **zexîre** | êwran, debar, zewade |
| **zexm** | 1. muhkem, berk 2. xurt *"cotê zexm, bi xeta pêşîn ve kifş e” |
| **zexm bûn** | 1. muhkem bûn, berk bûn 2. xurt bûn |
| **zexmî** | 1. muhkemtî 2. xurtî *“gur hay ji zexmiya xwe hebûya, dê bi carekê de hûfî dinyayê bikira” |

| | |
|---|---|
| **zexm kirin** | 1. muhkem kirin, berk kirin 2. xurt kirin |
| **zexmtir** | 1. muhkemtir 2. xurtir 3. qayîmtir *“dema ker bikeve heriyê, ji xwediyî zexmtir kes tuneye” |
| **zexnepûrt** | nifrînek e; ziqûm û zeherman |
| **zext** | pêkutî û dijwarî |
| **zeyî** | 1. keça ku piştî mêrkirinê tê serdana malbavana xwe 2. diyariyên ku di serdana pêşîn de didine keça mêrkirî *“keç di mala bavê de zeynet in, ava cêrên wan şerbet in, dayik dimirin zeyî tên jinbira bêrûmet in” |
| **zeyt** | rûnê zeytûnê |
| **zeytûn** | 1. cureyekî darên ku belçikên wê di rengê zîv de ne 2. berên dara zeytûnê yên ku piranî di taştêyan de tê xwarin û jê rûn jî tê bidestxistin |
| **zeytûnî** | di rengê zeytûnê de; reşê tarî |
| **zêç** | şevereşa ku çav tê de çavan nabîne |
| **zêde** | 1. pir, gelek 2. mişt*“hevalên şahiyê zêde ne, ên şînê kêm in” |
| **zêdehî** | 1. pirî 2. miştî |
| **zêdebarî** | serata |
| **zêde bûn** | pir bûn, gelek bûn |
| **zêdegavî** | 1. destdirêjî 2. neheqî |
| **zêdegavî kirin** | **,** 1. neheqî kirin 2. destdirêjî kirin |
| **zêdek** | nîşaneya danserhavê, (+) |
| **zêde kirin** | pir kirin, gelek kirin |
| **zêdemayî** | 1. serata 2. bermayî |
| **zêdetir** | 1. pirtir 2. bêhtir*“aqil, ji êqil zêdetir e” |
| **zêhn** | qabiliyeta têgihiştinê |
| **zêl** | tîke |
| **zêl kirin** | (goşt) tîketîkeyî kirin |
| **zêmar** | 1. helbestên li ser karesatan; mersiye 2. stranên bi şewat ên li ser karesatan |
| **zêmarbêj** | 1. mersiyebêj2. nifirbêj |
| **zêr** | madenê giranbiha yê ku jimara wî ya atomî79, giraniya wî ya atomî196.9, kurteya wî ya latînî Au ye û di 1064 dereceyan de jî dihele*“aqil, bi zêran jî nayê firotin” |

| | |
|---|---|
| **zêrandin/dizêrîne/bizêrîne** | 1. nalandin 2. lê dan |
| **zêrçe** | çêreya biharê |
| **zêrevan** | mifetiş, çavdêr |
| **zêrezêr** | 1. nalenal 2. kalekal, mikemik |
| **zêrezêr kirin** | 1. nalenal kirin 2. lavayî kirin |
| **zêrîn/dizêre/bizêre** | nalîn, azar kêşan |
| **zêyezê** | zimezim, kalekal |
| **zêyezê kirin** | kalekal kirin, zimezim kirin |
| **zibare** | karbeşî |
| **zibil** | 1. gemara heywanan2. gildîn, gilêş |
| **zibilgeh** | cihê ku gildîn û gemarê davêjinê; kaj |
| **zicêf** | binê solê; pençe |
| **zicêf kirin** | binê solê çêkirin an jî pençe kirin |
| **zift** | qîra rehn |
| **ziha** | marê girs, ejdeha |
| **zik** | 1. ji sîngê heta fêza navranê 2. cihê ku hûr û rûvî tê de ne 3. gewde*“hûrik, zik dike tûrik” |
| **-zik çêrandin** | ji bo nanê xweş û belaş li ber sêlan gerîn |
| **-zik gihiştin ber dêv** | (ji na ducanî) ji nêzik ve hemla xwe danîn |
| **-zik lê bûn def** | bê teşe xwarin |
| **-zik lê qurequr kirin** | ji birçînan deng ji rûviyan hatin |
| **zikat** | di îslamê de şertê her sal dayîna miqdareke malî ya diyar ji bo heşt komên diyarkirî*“zikata mirîşkê, hêk e” |
| **-zikat lê çûyîn** | pir belengaz bûyîn |
| **zikberçûyî** | kokê zikmezin |
| **zikir** | bîranîna Xwedê û qenciyên Wî *“axa li kêfê ye, xulam di zikrê de ye” |
| **zikir kirin** | Xwedê û qenciyên Wî bi bîr anîn |

| | |
|---|---|
| **zikmakî** | taybetiyên ku hê di zikê diyên giyaneweran de ji wan re çêbûne |
| **ziko** | çilek, silek |
| **zikqelêş** | hov û devbixwîn |
| **zikreşî** | çavnebarî, çavreşî |
| **ziktêrdek** | kesê ku zikê wî weke têrdeka penîrê nû ji ber hev çûye |
| **ziktilêr** | ziktêrdek, zikberçûyî |
| **zil [I]** | saz, qamîş; leven |
| **zil [II]** | sil, su |
| **-ji yekî/tiştekî zil çûn** | jê aciz bûn û dûrî wî sekinîn; nefret kirin |
| **zil [III]** | tev dan û vîz kirin |
| **-zil kirin** | 1. (birîn) tev dan û destê xwe lê birin û anîn2. rarûyî yekî/tiştekî ketin |
| **zilam** | mêr *“teyr bi refê xwe, birûsk bi zeriya xwe, zilam bi camêriya xwe” |
| **zilan** | bayê zexm |
| **zilm** | 1. sitem 2. neheqî |
| **zilmat** | şevereş |
| **zilq** | zîrç |
| **zilûk** | cureyekî raxistina ji cîl û cegenî ye |
| **zimag** | aliyê bakurî yê çiyayekî |
| **ziman** | endamê axaftin û çêjhildanê; lîsan *“zimanê xwe birî, cihê xwe kirî” |
| **-zimanê zikmakî** | zimanê bav û kalan |
| **-ziman di dêv ketana** | heke bikaribûna biaxivîna |
| **-zimanê yekî li ser xwe dirêj kirin** | ketin bin mineta yekî û firsenda tinazeyan çar kirin |
| **zimandirêj** | devbelaş |
| **zimanfis** | kesê ku nikare peyvan wekî pêdiviyê bi lêv bike û lewre jî tîpan diguherîne |
| **zimanfisek** | zimanfis |
| **zimanxweş** | zarşirîn |
| **ziman-nas** | 1. pisporê ku perwerdehiya zimanekî dîtiye û ji her aliyî ve li wî zimanî dikole 2. pisporê ku di zanîngehekî de li ser zimanekî waneyan dide |

| | |
|---|---|
| **ziman-nasî** | 1. zanistên têkildarî zimanekî û zaravayên wî 2. di zanîn-gehan de beşa ku li tevgera zimên dikole |
| **zimanzan** | zanayê zimên |
| **zimanzanî** | zanatiya zimên |
| **zimanzêrîn** | kesê ku razan venaşêre |
| **zimet** | 1. hemû deynên saziyeke bazirganiyê 2. mal û milkê ku ji aliyê kes an jî saziyekî ve tê parastin |
| **-xistin bin zimeta xwe** | parastina wî/wê aîdî xwe kirin |
| **zimezim** | 1. kalekala pêz2. zingezing |
| **zimezim kirin** | 1. (pez) kalekal kirin 2. zingezing kirin |
| **zimhêr** | dexl û derhat |
| **zimîn/dizime /bizime** | gumîn, gurmîn |
| **zimpere** | kaxeza ku bûjeneke girnozî pê ve hatiye |
| **zeliqandin** | û bi kêrî şimşatkirina rûyê tiştan tê; simarte |
| **zimrûd** | cureyekî gewherên ku şefaf û kesk e |
| **zinar** | kevirê mezin, sel |
| **zincî** | kalikê kalikî |
| **zincîr** | pêgirêdana ku ji xeleqên derbasîhevkirî pêk tê |
| **zincîrbend** | qeyda ji zincîran |
| **zincîrbendî** | kes û tiştê bi zincîran girêdayî*“zincîrbendîbûn ji şêran re ne ar e” |
| **zindan** | girtîgeh *“mala bavê meydan e, mala xezûr zindan e” |
| **zindî** | jîndar *“malê miriya yê zindiyan e, bi saxan dimîne” |
| **zindîq** | oleder |
| **-zindîqê zindîq** | olederê heram |
| **zingezing** | dengê ku ji pevketina tiştên hesinî tê |
| **zingilîn/dizin gile/bizingile** | cehimîn, dehirîn |
| **zingîn/dizing e/bizinge** | zingezing jê hatin |
| **zingînî** | zingezing |

| | |
|---|---|
| **-zingînî jê anîn** | bi şeqamê şîrqînî pê xistin |
| **zinîn/dizine/ bizine** | ziyîn, ta li hev gizîn |
| **zintod** | nivîsa girs |
| **zintol** | mirovê girs |
| **zipitandin/di zipitîne/ bizipitîne** | 1. tepisandin2. heta dêv tijî kirin |
| **zipitîn/dizipit e/bizipite** | 1. tepisîn 2. heta dêv tijî bûn |
| **ziq** | 1. rep û req 2. çik, çikandî û li piyan 3. leq |
| **-ziq bûn** | req bûn, bêtevger sekinîn |
| **-ziq dan** | leqandin |
| **-ziq kirin** | req kirin, bêtevger sekinandin |
| **ziqeziq** | dengê keran; zirezir |
| **ziqinandin/di ziqinîne/ biziqinîne** | 1. leqandin2. hejijandin |
| **ziqinîn/diziqi ne/biziqine** | 1. leqîn 2. hejijîn |
| **ziqitandin/di ziqitîne/ biziqitîne** | jan dan kezebê, pir êşandin |
| **ziqitîn/diziqit e/biziqite** | êşîn û jan pê ketin |
| **ziqûm** | cureyekî daran ê ku kulîlkên wê sor an jî spî ne û di dermansaziyê de ji bo tîmarkirina nexweşiya penceşêrê tê bikaranîn |
| **-ziqûm û zeherman** | nifireke bi du pimparên jehrîn e |
| **zir** | 1. qulebî, teqlîd 2. nerast3. ne ji heman dê û bavî |
| **zirandin/dizir îne/bizirîne** | ker dan qîrandin |
| **zirar** | ziyan, xesar *“gotin zirar e, kirin kar e” |
| **zirar kirin** | 1. ziyan dîtin2. kar nekirin |

| | |
|---|---|
| **zirav** | 1. tenik 2. şefaf |
| **zirav bûn** | 1. tenik bûn 2. şefaf bûn *“heta ku stûr zirav bibe, dê zirav jî biqete” |
| **ziravî** | 1. teniktî 2. şefaftî |
| **ziravk** | riwîneke zer û kesk a ku ji pişikê çêdibe |
| **-ziravk qetîn** | ji tirsan qutifîn |
| **zirav kirin** | 1. tenik kirin2. şefaf kirin |
| **zirbav** | mêrê jinê yî ku hin zarokên jinikê ne ji wî ne |
| **zirbe** | kilîla deriyan a darînî |
| **zirçêre** | çêreya ku di payîzan de ji nû ve zîl dide |
| **zirçik** | zûtik |
| **zirçikî** | kesê ku nikare li ser qûna xwe rûne |
| **zirçikî bûn** | xwe li ser piyan negirtin |
| **zirçikî kirin** | pir westandin |
| **zirçî** | zirçêre |
| **zirehpûş** | qutikê polayî ku fîşeng jê derbas nabin |
| **zirezir** | 1. dengê keran ê domdar 2. axaftina kerkî û nelirê |
| **zirezir kirin** | (ker) deng dan |
| **zirênc** | madenê ku jimara wî ya atomî 82, giraniya wî ya atomî 207.21, teqla wî 11.3, kurteya wî ya latînî Pb ye û di 327.4 dereceyan de jî dihele |
| **ziringe** | dengê zengilî |
| **ziringîn/diziringe/biziringe** | zingezing kirin, dingeding kirin |
| **zirî** | cureyekî kurmên xwînmij e |
| **zirîç** | berikên çekan; fîşeng |
| **zirîkî** | wekî ziriyan |
| **-zirîkî pê ve girtin** | di pêsîran de girtin û bernedan |
| **zirîn/dizire/bizire** | 1. (ker) bang kirin 2. ziqîn |
| **zirnazîq** | darê ku datînin ser bilindahiyekê û lê siwar dibin, gava aliyeke wê dadikeve aliyê din jî hildikişe; qirneqos |
| **zirney** | cureyekî alavên mûsîqayî ye û bi pifkirinê tê lêxistin |

| | |
|---|---|
| **-zirney pelixandin** | forsa yekî şikandin |
| **zirneyjen** | kesê ku bi pisporî li zirneyê dixe |
| **zirnix** | kevirê kibrîtê; kurkût |
| **zirp** | yekîneya leşkerî |
| **zirpî** | her endamekî yekîneya leşkerî |
| **zirpêt** | gonxwarina keran |
| **zirpêt kirin** | kerê nêr berdan ser mankerê |
| **zirqetik** | bihukek e |
| **zirt** | 1. derewên bêbinî 2. pertafên bêpîne |
| **-zirt dan** | xwe xwe gijgijandin |
| **zirteboz** | tund û hov |
| **zirtek** | derewkerê derewên bêbinî |
| **zirtezirt** | pizepiz |
| **zirtezirt kirin** | 1. bi devçepelî axaftin 2. axaftinên acizker gotin |
| **zirto** | zirtek |
| **zirx** | kinca ku ji têlên hesinî hatiye çêkirin û ji bo berevaniyê tê bikaranîn |
| **zirxdar** | xwedîzirx |
| **zirviçandin/dizirviçîne/bizirviçîne** | (mêwe û sewze) perçiqandin |
| **ziryan** | cureyekî bayê ku ji aliyê bakura rojhilatî ve tê |
| **zirz** | serhişk û hêrsokî |
| **zirz bûn** | bihêrs bûn |
| **zirze/zirzile** | kilîl |
| **zirze/zirzile kirin** | kilîl kirin |
| **zişt** | kirêt |
| **zivêr** | zîver |
| **zivêr bûn** | zîver bûn |
| **zivêr kirin** | zîver kirin |
| **ziving** | şkeft |
| **zivir** | 1. nenerm û girtikgirtikî2. veger |

| | |
|---|---|
| **-kinca zivir** | cilên ku di dema lixwekirinê de laşê mirovî aciz dikin |
| **-zivir zivir dîsa li vir** | tu cihî naêwire û cardin vedigere warê xwe yî kevn |
| **zivirandin/di zivirîne/ bizivirîne** | 1. wergerandin2. fetilandin 3. dagerandin4. hilgerandin*"dema kêr (karî) rû dizivirîne, dema şîvê kêvçî tîne" |
| **zivirîn/dizivir e/bizivire** | 1. vegerîn 2. fetilîn 3. dagerîn |
| **zivistan** | demsala berf û seqemê *"biharê pez, payizê rez, zivistanê ez" |
| **-zivistanê serî girtin** | sir û seqemê ji nişkê ve dest pê kirin |
| **zivronek** | çivange |
| **zix** | şilegemara heywanan a ku tepisiye hev |
| **-bêhna zixê jê hatin** | bêhna heywanan û gemara wan jê hatin |
| **ziwa** | neşil |
| **ziwahî** | neşiltî |
| **ziwa bûn** | ji şilahiyê xilas bûn, şilahî jê dawerivîn |
| **ziwa kirin** | ji şilahiyê rizgar kirin, şilahî jê dawerivandin |
| **ziyan [I]** | zevî |
| **-ziyanê xelqê çêrandin** | sewal berdan nav zeviya xelqê |
| **ziyan [II]** | 1. xisar, zirar 2. zede *"devê tirş, ziyanê dide xwe" |
| **-ziyan gihandin** | xesar dayîn, zirar lê xistin, zede lêxistin |
| **ziyandar** | xesardar, zirardayî |
| **ziyanî** | dayîna miqdarek malî ji ber xesara ku pêk hatiye |
| **ziyankar** | zirardar |
| **ziyîn/dizî/biz î** | ta li toterîkê alandin, ta gilok kirin |
| **zîbeq** | madenê ku jimara wî ya atomî 80, giraniya wî ya atomî 200.5, siftiya wî 13.59, kurteya wî ya latînî Hg, di 327.4 dereceyan de jî dihele û piranî di germjimêran de tê bikaranîn |
| **zîh** | pizdanka sewalan |
| **zîk** | bendê şimakirî |

| | |
|---|---|
| **zîl** | 1. şax, peraş 2. aj, ajero |
| **-zîl dan/vedan** | 1. şax vedan, peraş dan 2. aj dan, ajero dan |
| **zîlan [I]** | kunên ku ji bo mifteyê di deriyekî de vedikin |
| **zîlan [II]** | bayê sext û ziwa |
| **zîlan [III]** | serê boçika ajalan zîlik çêreya biharê, zêrçe*“zîlika biharê, debara malê” |
| **zîlo** | zirî, tizrûg, zêlû |
| **zîn** | alava ku datînin ser hespan û li serê siwar dibin*"merivê dîn, naçe ser zîn" |
| **-zîn li bizinê kirin** | bi lez û bez tevdîra çûyînê kirin |
| **zîn kirin** | zîn danîn ser pişta hespê û girêdan |
| **zînkirî** | 1. hespê ku zîn danîne ser piştê û tengê wî şidandine 2. amade*”dostê kevn, hespa zînkirî ye” |
| **zînet** | xeml, arayişt |
| **zînî** | 1. gir 2. kêrt |
| **zîp** | rojên ji 26’ê Reşemiyê hetanî 5’ê Adarê yên ku bi awayekî gelêrî biyom tên hesibandin |
| **zîper** | 1. katara stûyî, patika stûyî 2. keziyên mil; edale |
| **zîpermasî** | cureyekî masiyên zeryayî ye |
| **zîpik** | 1. barija qeşayên girover; şexte, teyrok 2. kelexwêdan 3. peqpeqokên ku li ser ava keliyayî dikevin *“ber baranê revî, zîpik lê qelibî” |
| **zîranî** | meraq |
| **zîranewa** | kesê meraqdar |
| **zîrç** | 1. gemara heywanên bibask 2. zirênc |
| **zîre** | cureyekî reheka ku tovê wê wekî biharatan tê bikaranîn |
| **zîrek** | 1. jîr 2. jêhatî 3. egîd |
| **zîrekî** | 1. jîrtî 2. jêhatîtî 3. egîdî |
| **zîrevan** | 1. jêhatî 2. aqilmend |
| **zîrfon** | cureyekî daran ê ku belçikên wê wekî çayê tên bikaranîn |
| **zîtik** | pehîna heywanan*“tu bidî zîtikan nedî zîtikan, tu dê bidî heqê dîzikan” |
| **zîv** | madenê giranbiha yê ku jimara wî ya atomî47, giraniya wî ya atomî107.88, siftiya wî 10.5, kurteya wî ya latînî Ag ye û di 960 dereceyî de jî dihele *“axaftinan bi zîvî bikire û bi zîvî bifroşe” |
| **zîvan** | deq û xalên di lêş de |

| | |
|---|---|
| **zîvêr** | 1. acizbûyî, nerehet2. bêzar |
| **zîvêr bûn** | 1. je aciz bûn, nerehet bûn 2. bêzar bûn |
| **zîvêr kirin** | 1. aciz kirin2. bêzar kirin |
| **zîvîn** | tiştê ji zîvî çêbûyî |
| **zîwan** | çêreyên biyanî yên ku di nav zevî û bîstanan de hêşîn dibin |
| **zîx** | 1. serikên çereyê yên ku teze derdikevin 2. serên rihan ên ku teze derdikevin |
| **zîx dan** | (serên çereyê an jî rihan) pê de pê de derketin |
| **zîz** | 1. hestiyar 2. bihîstyar, hesas |
| **-dengê zîz** | newaya dawûdî |
| **zîzok** | vizvizîk |
| **zo** | du heb kit; cot |
| **zome** | 1. herêm, dever 2. koma konên li warekî bicihbûyî |
| **zonp** | mîrkut |
| **zoq** | çavên çikvekirî |
| **zoq bûn** | bi awayekî ku kanikên çêv nelivin li tiştekî nihêrtin; ziq bûn û nihêrtin |
| **zor [I]** | 1. pir, zêde 2. xelî3. lap |
| **zor [II]** | 1. hêz 2. neheqî*"zor, fendan betal dike" |
| **zorekî** | bi darê zorê |
| **zoran** | 1. desthilat 2. qeb, gulaş |
| **-zoran girtin** | gulaş girtin |
| **zoranî** | 1. desthilatî 2. gulaş |
| **zorbe** | zordar |
| **zorbetî** | zordarî *"bi darê zorbetiyê muhbet nabe û darê zorbetiyê zû dişkê" |
| **zordar** | sitembar, zalim |
| **zordarî** | sitembarî, zilm |
| **zordest** | zordar |
| **zordestî** | zordarî |
| **zot [I]** | nifir |
| **zot [II]** | tûjkirina devê kêrê û hesinê gîsnê cotan |
| **zot kirin** | tûj kirin |
| **zov** | cureyekî bihukan e; çilpê |
| **zozan** | havîngeh, sermiyan*"zozan, bêzirar nabe" |

| | |
|---|---|
| **zozanî** | kesê ku havînan koçî cihên hênik dike; sermiyanî |
| **zuhd** | dîndarî |
| **zuhdî** | dîndar, zahid |
| **zuhim** | rûnê bêz; zon |
| **zurbe** | keriyê guran |
| **zurg** | di qûntara çiyan de cihê xişirge, kêrt û kort |
| **zurxax** | di aşên avî de cihê ku av tê re derdikeve |
| **zû** | 1. biecele, bi lez û bez2. ne di wextê xwe de*“çavê tirsiyayî, zû xwelî dikevê” |
| **zûr** | kesê ku her li cihekî tenê dinêre |
| **zûr bûn** | li pey hev li heman cihî nihêrîn |
| **zûrîn/dizûre/ bizûre** | 1. (gur) kastekast kirin 2. (mirov) lavayî kirin *“ez çûm serê çiyan û zûriyam wekî guran, birazî nabin bira tu caran” |
| **zûro** | 1. çavzoq 2. kesê ku çavên wî her tim tiştê li destê xelqê ye |
| **zûka** | bi lez û bez |
| **zûkayî** | lezgînî |
| **zû kirin** | 1. ecele kirin 2. lezandin 3. bezîn |
| **zûr bûn** | 1. bi baldarî nihêrîn2. çav kutan tiştekî |
| **zûrezûr** | 1. dengê seg û guran 2. zêrezêr 3. nalenal*“axîna kûr, ji dilê bi zûrezûr tê” |
| **zûrîn/dizûre/ bizûre** | (gurg û seg) nalîn, zêrîn, azar kêşan, kûstekûst kirin |
| **zûtik** | qûn, tabût, tilor |
| **-zûtik derketin** | 1. ji ber karê giran piştşkestî bûn2. pir lawaz bûn |
| **zûtir** | bi leztir |
| **zûtirîn** | bi awayê herî ecele |
| **-di zûtirîn katê de** | di heyameke herî bi ecele de, bi leza bê |
| **zûtirka sibehê** | beriya ku zerekiyên tavê bidin rûyê erdê |
| **zûxal** | şewate, ardû |
| **zûxav** | kêma birînê |
| **zwî** | kurmê doranan |